DÎROK

Kurdî kurmancî

Havîna 2017 an

NAVEROK

BAŞÛRÊ KURDISTANÊ

ÇEND RÛPEL JI DIROKA GELÊ KURD

DI SEDSALA 21. DE

DÎROKA KURDÊN KOÇBER 1

DÎROKA KURDÊN KOÇBER 2

DÎROKA KURDISTAN BI KURTEBIRÎ

GERA BAŞÛRÊ KURDISTANÊ

KURD

KURD NEVÎYÊN MÎDÎYAN

LI SER RÊYA AZADÎYA KURDISTANÊ DE

REWŞA ÊZIDIYAN

ŞERÊ KENDAVÊ Û KURD

ŞOREŞA BÊDENG

DÎROK

BAŞÛRÊ KURDISTANÊ

HESENÊ METÊ
gername
BAŞÛRÊ KURDISTANÊ
www.nefel.com
info@nefel.com
NEFEL
1
BAŞÛRÊ KURDISTANÊ
E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM
2
E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM
BAŞÛRÊ KURDISTANÊ
HESENÊ METÊ
NEFEL
Stockholm
2002
www.nefel.com
info@nefel.com
3
Hesenê Metê:
Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden
www.nefel.com
info@nefel.com
© Hesenê Metê û Nefel

Çapa dîjîtal: 2002
Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan
Fotoyê nivîskarî: Arif Zêrevan
Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.
Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike
û di Internetê de bêxe malpera xwe.
4
Ji haziran ne çêtir, ez û dostê xwe î hêja, Elî Çiftçî ne. Lê anuha dema ko ez van rêzan reş dikim, divê ez rengdêra wî ya pîroz jî bi navê wî ve bikelînim û bibêjim hecî Elî Çiftçî. Ez ê dû re ji we re bi lêv bikim ka wî û bêguman min jî kengî xwe gîhand merteba vê rengdêra pîroz, bi gotineke din, rengdêra hecîtiyê. Belê, min got ez û wî ne, em bi hewa dikevin û berê me li Şama Şerîf e. Li jor, li asimanan şeva roja 25an li me dibe roja 26an.
Saet li duduyê şevê em serejêrî erdê dibin û germa Şama qedîm tavilê bi me dide zanîn ko em li erdekî din dahatine. Li gel brokrasiyeke navno jî em ji deriyên balafirgehê derbasî der dibin û germeke xurt li me vedinişe. Xwedê jê razî, bi edet û marîfetên kurdên binxetî Zeredeşt û dostekî xwe hatine pêşiya me. Wê şevê di otêla Karawan de em serê xwe didin ser
balîvan û ro li me bilind dibe. Ji bo karê xwe yê çûyînê divê em biçin buroya hukumata Kurdistanê û em welê jî dikin. Zeredeşt jî bi me re ye. Li wir, li buroyê bi qedir û qîmet em rastî kek Remezanê nexşîn tên. Nexşîn dibêjim... kek Remezan navsereyekî şîrîn e. Piştî xêrhatineke germ em pê didine zanîn ko em ji kuderê hatine û em ê bi kuderê de biçin. Dosiyereke tijî kaxiz û faksên fermî ji refikekê dadixe, datîne ber xwe û ji min re dibêje:

— Navê te bi xêr, ji kerema xwe re ka pasaporta xwe?
Ez pasaporta xwe didime wî û dibêjimê:
— Xêra Xwedê li cenabê te... navê min, ev navê li pasaportê ye.
— Himm... dibêje, li pasaporta min dinêre, kaxizên di dosiyerê de di ser hev de diqulibîne û di wê gavê de telefonek jê re tê. Bi serbilindiya kar-
mendekî radihêje telefonê û li hev dipirsin... Di telefonê de pirsa wî û çend kesên din jî dike, li rewşên wan dipirse, henekan dike û dikene. Piştî demeke ne kurt telefonê datîne û dîsa li navê min dipirse. Ez dîsa navê xwe jê re dibêjim. Du tiliyên destê xwe î rastê bi zimanê xwe şil dike û dîsa
bi nav kaxizên dosiyerê dikeve. Ez bi xwe nizanim ka ew li çi digere û çi nabîne. Li min vedigere û dibêje:
5
— Tu xelkî kîderê yî, bira can... dibêje, ev navê te... navê dê û bavê te jî li virê ne diyar e.
Ez dipişirim û dibêm:
— Ez xelkê Diyarbekirê me, can... û ev hevalê min jî ji kurdên Anatoliya Navîn e. Di pasapaortên me de navê dê û bavan tuneye, rast e. Kêfxweşî li ruyê wî diyar dibe ko em kurdên bakur in. Bi çavên du mê-
vanan li me mêze dike. Ez bawer im ji ber evê yekê ye ko ew careke din xêrhatinê li me dike. Dû re bi dengekî banî çaygerê xwe dike ko ji me re ava sar û çayê bîne. Bi zarxweşî ji min re behsa xwe û pêşmergetiya xwe dike. Carekê li hêla Şirnexê hatiye girtin, leşgerên tirkan ew li erdê dirêj kirine, bi keviran li ser pişta wî dîwar lê kirine, gelekî hov û zalim bûne, heşt mehan di hundur de hiştine... piştî vê serpêhatiye xwe vedigere ser min û dibêje:
— Baş e, navê bavê te.

— Navê bavê min Fêzo.
— Û navê diya te?
— Heca Bêzo, dibêjim... li Stockholmê jî me welê faksî vir kiriye. Divê li van kaxizan hebe, dibêjim.
Çay tê, li me û wan kesên wir belav dibe û ew jî hêj li nav kaxizên dosiyerê li me digere. Ji çayger re dibêje:
— Pencerê veke.
Çayger welê dike. Telefoneke din tê... û ew dîsa dest pê dike û bi şêweyekî kurmancî diqedîne, dixwazim bibêjim dirêj dike. Dû re vedigere ser min û dibê:
— Te got navê dê û bavê te çi bû?
— Navê bavê min Fêzo û navê diya min jî Heca Bêzo... weke gotinên sitranekê ye... lê navê dê û bavê min wusa ye, dibêjim û dipişirim. Mîna ko bibêje ma wekî din nav tune bûn, bi pişirîn li min dinêre û dîsa li nav kaxizan digere. Li min digere, li diya min digere, li bavê min î rihmetî digere.
Bi awayekî rengîn em karê xwe î formel û brokratîk diqedînin. Em derdikevin û em ê dîsa dakevine nava bajêr û werin otêla Karawanê. Lê di
rê de ji Zeredeşt dixwazim ko berê me bide Taxa Kurdan, goristana Mewlana Xalidê Nexşîbendî, ez jê daxwaz dikim ko em biçine ser gorna Mîr Celadet û mala Bedirxaniyan.
Royê xwe havêtiye paş çiyayê Taxa kurdan. Bi êvara teng re em xwe digêhînin goristanê û belekiya mekanê mala Bedirxaniyan tavilê bi min
6
dide zanîn ko ev mekanê bi kevirên reş û sipî, mekanê wan e. Meriv zû têderdixe ko ev mekan nîşana Birca Belek û yên tê de jî ji mîrên Botan e. Piçûk e, çarmedorî mekan bi qasî duwanzdeh mîtroyan e. Xwe bi xwe:

»Xwedêyo,« dibêjim, »hukmê mîr û mîrekiya Botan çiqas guvişiye ser hev û piçûk bûye!« Bêyî ko li ser bifikirim bi herdu destan fatîhayeke erebî dixwînim (fatîheya ko ez hîn jî nizanim bê maneya wê çi ye) û di ser Bedirxan Begê botî de dirijînim. Nizanim çima lê di wê gavê de hîseke welê li min çêdibe ko ew el-fatîheya erebî ji bo Mîr Celadet Bedirxan çênabe û ez jî nakim, ez fatîheyê bi lêv nakim. Ez difikirim û di dewsa el-fatîheya erebî de di dilê xwe de dibêjim: »Yezdanê pak û dilovan ciyê te fere bike û koşkek kesk bike para cenabê te, Mîrê min.« Û ji bo Rewşen xanimê jî... li vir divê ez li xwe mikûr werim ko ne bi erebî û ne jî bi kurmanciya reş… ez gotinan ji bo vê xatûnê nabêjim, lê tenê dikevim ramanan. Ez difikirim û xwe bi xwe dibêjim: »Ez nizanim Rewşenxan, ez nizanim gelo te ji rojan rojekê dilê Mîr Celadet Bedirxan şikand û te cenabê wî eciz kir, an ne? Xwezî di saxiya te de min jî xwe bigîhanda te û kevneşekaleke Mîr ji te bixwesta. Lê ez li ser evan kevirên mekanê gornên we sond dixwim ko min ê ew şekal bi ser lingên xwe ve nekira û min ê negota: şekalên min e. Min ê bigota şekalên Mîrê min e. Dû re min ê bizmarekî zengalî ji ewan şekalan rakira, min ê benek bavêtayê û weke xaça Mesîh bi hustuyê xwe de bikira û heta roja mirinê jî min ê bi xwe re bigeranda. Wek ko min got, li her deverê jî min ê bigota ev şekal, şekala Mîr e… min ê bigota, min ji Rewşenxanê girtiye. Sond dixwim û careke din dibêjim ko ez ê li şekalê xwedî derneketama û min ê negota ev şekal, şekala min e... te got erê, Rewşenxan!«

Di wê gavê de hîseke seyr girtiye ser min. Ji min wetrê ez cenabê Mîr pir ji nêzîk ve nas dikim, ji min wetrê ew jî ji deverekê min nas dike. Xwîna min lê dikele û kêla gorna wî min ber bi xwe dikêşe. Di dilê xwe de: »Mîrê min,« dibêjim, »wek ko min got, va ye ez hatim, ez... ez im Mîrê min. Nizanim tê bîra te an ne, wê şevê... şeva ko Darînê Daryo* rabû dûrûdirêj Êşa xwe ji te re vegot, ez... ew î ko wê şevê, piştî wê çîrokê

bi Darînê Daryo re serê xwe da ser balîvekê û kete xewê... belê, min got, ez ew im, ez ew kes im, Mîrê min.« [*Darînê Daryo lehengê çîroka Êşê ye ko Hesenê Metê nivîsiye. Di çîrokê de Darînê Daryo bi portreyê Mîr re dipeyive, derd û kulên xwe jê re vedibêje. Nefel]
Û wê şevê em berê xwe didin bakûr û bi rohilata 27ê mehê re em digêhîjin Qamîşloyê. Li termînala otobusan em dadikevin û em xwe di
7
nav lepên şofêrên texsiyan de dibînin. Ji şofêran yek bi milê min digire û dikêşe, û yekî din jî tevî çentê me hecî Elî Çiftçî ber bi texsiya xwe radikêşe. Herdu jî xort û bi salên xwe ji me piçûktir in. Ez bi pişirîn li şofêran vedigerim û dibêjim:
— Çênabe, em her yek bi aliyekî ve naçin. Em herdu jî diçin derekê, bi qurbana we!
Ji şofêran yek li yê din vedigerîne û dibêje:
— Evana mêvanê min in, ez hatime pêşiya wan.
Hecî Elî Çiftçî jî welê bawer dike ko Ferhad Çelebî ew şandiye pêşiya me. Ji bo me ne xem e ko kî ê me bibe nava bajêr, lê ez dizanim ko em ne mêvanê ewî şofêrî ne û Ferhad Çelebî jî ew ne şandiye pêşiya me. Tiştê herî xweş ew e ko herdu şofêrên xort jî bi hev re û bi me re bi kurman-ciyeke malê dipeyivin. Baş e, dibêjim û em xwe bi dest şofêrekî ve berdidin. Lê hecî Elî Çiftçî hîn jî welê bawer dike ko Ferhad Çelebî şandiye pey me. Di texsiyê de şofêrê xort ji me dipirse ka em ê bi kuderê de biçin. Bêyî ko zêde bifikirm, zû û bi awayekî pir normal:
— Mala Ferhad Çelebî, dibêjim, ma em ê wekîdin bi kuderê de biçin?
Şofêrê me î xort li me vedigerîne û dibêje:
— Mala Ferhad Çelebî li kuderê ye?
— Nizanim, dibêjim, ma ne ewî tu şandiye pêşiya me, te welê got?
Bêyî ko bersiva pirsa min bide, dibêje:

— Êê... ko hûn bizanin, mala wî li kuderê ye, ez ê we bibim wir.
Vê carê bi ken lê vedigerînim:
— Nizanim, dibêjim, te ji şofêrê din re got ko em mêvanê te ne û tu hatiye pêşiya me.
Li ser evê gotina min, ew jî dikene û ez ji hecî Elî Çiftçî dixwazim ko ew telefonekê ji Ferhad Çelebî re veke. Hecî Elî Çiftçî welê dike, mobîla xwe bi Ferhad Çelebî re dipeyive û dû re telefonê dirêjî şofêrê xort dike. Şofêr, me heta ber deriyê mala Ferhad Çelebî dibe û em pereyekî li gor dilê wî didine wî.
Pêşiyê di germiya Qamîşloyê de û dû re jî em xwe di nav germiya nas û dostên binxetê de dibînin. Ji haziran ne çêtir, binxetiyên me weke xwî û marîfeta xwe ya binxetî hertim merva û xwîngerm in. Di van du rojan de em diçin mala Konê Reş jî. Di ewê germê de, li eywana malê pêşiyê em avekê û dû re jî em çayekê di gewriya xwe de berdidin û dû re jî hûn dizanin: cixare... dema ez dûyê cixara xwe ber bi jor dişînim, di wê gavê de awurên min li dîwarê odê asê dibe, dîwarê ko serê xezalekê tev

şivedareke hespê pê ve dardekiriye. Li ser evê yekê Konê Reş berê xwe dide min û bi serbilindî dibêje:
— Ev serê xezalê ji nêçira cenabê Mîr Celadet Bedirxan e. Ewî bi destê xwe nêçira vê xezalê kiriye... nêçira rihmetî ye.
Bi van gotinên Konê Reş re heta çend hilmên kwîr jî ez çavên xwe ji wê nêçira Mîr nakutim û pê re dûr diçim. Dema ko ew van gotinan dibêje jî, wek ko min got, pir serbilind e, serbilindî jî ew e ko ji bermayên mîrê Botan tiştek li mala wî jî heye. Dû re dixwazim wî serwext bikim ko ciyê parastina bermayên nêçira Mîr û gelek tiştên din, ne mala min û wî ye. Divê li ciyekî ewletir bêne parastin ko bimînin. Weke manewiyeta xwe ev tişt ji bo me giranbuha ne. Dû re vedigerime ser Konê Reş û ji dilekî

pak dibêjimê:
— Dîsa jî mala te ava, ya ciwamêr. Ko te anuha rabûya û bigota ev serê xezalê ji nêçira min e… û te bigota min bi destê xwe ew kuştiye, me ê çi xwelî li serê xwe bikira!
Kenekî hûr bi civata me ya hazir dikeve. Lewra ew jî dizanin û bihîstine ko di roja îro de hinek kesan dest danîne ser bermayên Mîr û li ser rûniştine. Lê ez naxwazim ew zêde bikenin. Dîsa vedigerim ser Konê Reş û dibêjimê.
— Lê dîsa jî xwelî li serê binxetiyan! Me serxetiyan… me Mîrek, me malek û me dîrokeke serxetê sipart bextê binxetiyan, lê nikanî bûn xwedî lê derketana! Li cenabê Mîr Celadet Bedirxan xwedî derketin, lê ne li tiştên wî. Ji bilî evî seriyê xezala ji nêçira wî… de ka çiyê wî maye, Konê Reş? Ma çêdibe ko çakêt û qapûtekî kevin ji ber kincên wî ne ma be, ma çêdibe ko derpê û kirasekî wî, şekal û gopalekî wî, wêne û nexşekî wî, defter û nivîseke wî, qelem û karekî wî ji ber jiyana wî ne ma be! Na ezbenî, na... hûn binxetî germ û merva ne, lê di evê yekê de we sistî kiriye. We bermayên Mîr ne parastine, bi awayekî pêwîst we xwedîtî li bermayên cenabê wî ne kiriye. Lê divê hûn welê bizanin ko ji ber evê sersariya we binxetiyan, ne dîrok û ne jî Xwedê we efû dike. Nifşên li dû me bi serê xezalekê têr nabin, ya Konê Reş, ew ê gelek tiştên din jî bixwazin.
»Tetz Rooke î hêja!
Ji bo karê wergera niviskarê xwe, te kinc û şekalên xelkên welatê wî li xwe kir ko tu xwe di atmosfera niviskar de bibînî û welê wergera berhema wî bikî. Ez pîroziya kar û kerametê te fam dikim. Lê ez xwe fam nakim, Tetz Rooke. Ji ber ko ne weke wergerekî, lê ez wek xwendevanekî
9
normal bi şopa niviskarên xwe ketim û heta bajar û gundên wan çûm. Bi gotineke din, bi çolên Amûdê û bi gotina niviskarên xwe ên ezîz, ez bi

toza Amûdê ketim. A ew toza Amûdê min ber bi xwe dikêşe û ez diçim. Çi hîkmet e, çi qudret e ko min ber bi wir dikêşe ez nizanim, lê wek ko min got, ez jî wekî te… lê dîsa jî ne wekî te ber bi wir diçim.«
Li Girê Mozan digerim û têm li ber Girê Şeremola disekinim. Ji dostên dora xwe re: »Na, dibêjim, çênabe ko ev Girê Şeremola be. Min di pirtûkan de xwendiye, min di helbest û çîrokan de xwendiye û li wir, di nivisên wan de min Girê Şeremola dîtiye. Girê Şeremola divê bi qasî çiyayê Qertewînê bilind be. Ev çi ye, dibêjim, sergoyên li ba me jî ji evê xweliyê bilintir e.«
Piştî ez serwext dibim ko ev gir bi rastî jî Girê Şeremola ye, girê ko di çîrok û helbestan de hatiye vegotin, li xwe matmayî dimînim û ji wan dostên dora xwe re dibêjim. »Anuha ez baştir bi qudreta gotinan, gotinên niviskaran hesiyam. Ez ji Diyarbekira reş im, bedena dorê li ser heyştê û du bircan e, duwanzdeh mîtro bilindî û bi qasî pênc hezar gavên mêrane dirêj e. Lê gotinên niviskaran ev Girê Şeremola ji ewê bedenê jî berztir kiriye.«
29ê mehê ye. Em ji Qamîşloyê heta ber devê şetê Cizîra Botan, ber bi rohilat diçin. Em li ber devê avê ne. Em li vî aliyê avê ne û aliyê din î avê jî bi me ve xuyaye. Li wê hêla avê komek leşgerên kurd, ji avahiyên gumrika derê welêt dûr hatine û li ber devê avê dipên. Tîna miqedesiya navê Kurdistanê ji wî aliyê din dide me û şewateke hesreta navekî welê li hestiyê lûtê me dide der. Di wê gavê de ez baştir serwext dibim ko tiştekî bi navê bihiştê tuneye. Hebûna tiştekî welê ne bûye.
Dibêjin ko bihişt tune bûye û tiştekî welê jî tuneye. Rîwayet dibêjin dema ko Xwedê hezretî Adem ji axê çêkir û piştî gunehkariyê ew ji Baxê Edenê dûrxist, rabû heta ko mir jî ne hişt hezretî Adem careke din li wê axê vegere. Piştî demekê hezretî Adem bi hisreta axa xwe bêriya wî erdê xwe kir. Bi gotineke din, ew erdê ko Xwedê ew jê çêkir. Hezretî Adem

ewqas bêrî kir û ewqas bi nexş û xweşikiyan nîgara wî erdî kir ku... ev nîgara bêrîkirina wî, di serê nifş û neviyên piştî wî de, nefs û navekî bihiştê girt. Ew welê pê jiya û welê jî mir. Ji wê rojê û pê ve navê bihiştê di nava nifşên piştî wî de belav bûye û îro jî her welê ye. Û ev dîtin, dîtina ko dibêjin bihişt tuneye... wek ko min got, anuha ez baştir têdigêhîjim. Raman û hîsên ko me ber bi vê axa me ve dikêşîne jî… ez bawer im ev
10
yeka ha ye. Axa me bi min û ez welê bawer dikim ko bi hecî Elî Çiftçiyê dostê min jî weke bihiştê dixuye û em ê jî biçine wir. Li ber devê avê problemeke brokratîk derdikeve, Ridwan* an jî mixaberatên xêrnexwaz nahêlin hecî Elî Çiftçiyê dostê min têkeve bihiştê. Li gor karmendê mixaberatê li ber devê avê, navê hecî Elî Çiftçî di defterê de tune bûye. Li ser vê yekê jê re dibêjim: »Ez ê li hêla hundur li bendî te bisekinim, tu jî vegere û here navê xwe di defterên ereban de bibîne û vegere. Ko tu venegerî
ez ê telefonê Qamîşloyê jî bikim.« [*Rîwayet dibêjin melekê li ber derê bihiştê bi navê Ridwan e. Nefel]
Hecî Elî Çiftçî vedigere. Em rêwiyên mayî, em bi kelekeke piçûk derbasî hêla din dibin, hêla ko me got bihişt, me got Kurdistan. Em bi qasî bîst rêwiyan in. Jin hene, zarok hene, keç û xortên xama û kesine salmezin hene, soran hene, kurmanc hene… Nizanim çima, lê ew î ko pêşiyê li kelekê siwar tê, ez im. Ez û rêwiyên din, em bi kelekê li ava şetê Cizîrê dikevin. Kelekvanên me jî ji kurmancên hêla bihiştê ne. Şet fere û bi rengekî keskeşînekî vekirî ye. Bêdeng û boş diherike. Ne zêde babetekî ewle ye ko meriv bi kelekên weha li aveke welê bikeve û derbasî hêla din bibe. Lê di rewşên weha de… meriv hertiştî dide xatirê nav û axa Kurdistanê. Min got, zarok jî hene, di wê gavê de du zarokan di çav xwe re dikim, difikirim û xwe bi xwe dibêjim, » Ji van deran dûr! Xwedê neke

kelek biqelibe û zarok têkevine avê, ez ê wan çawa xelas bikim?« Ez didime bala xwe ko ez ê bikanim tenê yekî xelas bikim. Li gel van ra-manên xwe î kambax, em ber bi qeraxê hêla din diçin. Lê hêla din... wek ko min got, ez nizanim çima lê yê ko pêşiyê dadikeve jî, dîsa ez im. Ez ji kelekê dadikevim, lingên min bi erdê dikeve û bi qasî coşa evê avê, çoşek di ruhê min de dilive û ez jî baş hîs dikim. Ji wê koma leşgerên kurd, leşgerên ko li ber devê avê li bendî me ne, du kes weke şêran ber bi pêş tên
û bi qasî sê werîsan ji devê avê dûr disekinin. Ji wan yek dengekî li min dike… wek ko min got berî herkesî ez dadikevim. Ew ji min re dibêje:
— Ji kerema xwe re, bira can... ji kerema xwe re çentên xwe li wir dayne û wereqa navê xwe bîne!
Bi bihîstina evan gotinên leşger re di dilê xwe de: »Ez bi qurbana ewî dengê te bim!« dibêjim û di wê gavê de hîseke seyr li min radibe. Heta nuha min ji leşgeran hez ne kiriye, min ji rengê kincên wan hez ne kiriye, min ji sîlehên wan hez ne kiriye. Hîn jî tênagêhîjim çima, ew rengê kincên wan, ew sîlehên li milê wan, ew bejn û bala leşgeriya wan û ne-

maze ew fermana wan a bi kurmancî... ev hemî tişt li min dibe bawerî, li min dibe hêz û xurtî, li min dibe serbilindî... bi serbilindî ez çentê xwe datînim û bi gavên ewle û aramî ber bi wan diçim. Dixwazim fermana wan bi cî bînim. Wek ko min got, navîna min û wan du leşgeran bi qasî sê werîsan e. Lê di wan gavên di navîna min û wan de, di wê dema kurt de ew hemî şehîdên ko ji bo erdekî welê ketin û eniyên xwe dan axa sar... ew hemî keç û berzewacên ko ji bo navekî welê ji keçaniya xwe bûn û xwe
di zinaran werkirin... ew hemî dengbêjên ko ji bo dar û kevîrekî welê destan gotin û çûn... Xwedêyo, a ew hemî maqûl û hêjayên kurd li ber

çavên min peyda dibin, coşa dilê min berz û tije dibe, gewriya min tije dibe, çavên min tije dibe û heta ko ez di wan çend gavan de xwe digêhînime nik wan leşgeran, av di çavên min de nahewe û tê xwarê. Yek bi yek ez wan herdu leşgerên kurd hemêz dikim, bi defa sîngê xwe ve dişidînim, eniya wan maç dikim û wekîdin... wekîdin tenikiya dilê min, ava çavên min rê nade min ko ez navê xwe î li ser wereqa xwe ji wan re bi lêv bikim. Tenê tiştekî dikim, wê perçekaxiza navê xwe, bi gotina wan, ez wereqa navê xwe dirêjî wan dikim û hew.

Leşgerên kurd têdigêhîjin û Xwedê dizane di jiyana xwe de ev cara yekem e ko ez dibînim va ye leşgerên têgêhîştî jî hene. Belê, têdigêhîjin, dikevine milên min, min dibin binê siya kepira xwe, li ser kursiyekê cî didine min:

— Bêhna xwe fere bike, bira... şikir ji Xwedayî re eve tu hatî axa xwe, tu ê biçî gundê xwe, tu ê dê û bav... tu ê xizm û nasên xwe bibînî, dibêjin û dixwazin kela dilê min daxînin.

Ez xwarî erdê dibim, radihêjim kevirekî didim ser eniya xwe û li ser kursiya binê siya kepirê cixareyekê agir dikim. Ew çend rêwiyên din karê nav û kaxizên xwe diqedînin û ber bi jor, ber bi lojmanên deriyê gumrika welatê me diçin. Piştî çûyîna wan rêwiyên din, herdu leşgerên kurd vedigerine ba min. Di kişandina cixara xwe ya duduyan de, deng ji min derdikeve û bersiva leşgerên xwe didim. Ji wan yekî tenik î dirêj ji min dipirse û dibê:

— Tu ji kîderê yî, bira?

Ez baş dizanim ko qesta pirsa wî Dehok, Zaxo an jî gundekî ji wan doran e. Ez jî bersivê didim û dibêjime wî:

— Ez ji hêla bakur, ji Diyarbekirê me, can.

Piştî ko ew têdigêhîjin min ne dê û bav, ne jî xizm û nas li vî aliyî hene, wê çaxê bêtir li rewşa min germ dibin, ew jî qedir û qîmeteke bêtir didine

12

vê diltenikiya min û em bi hev re dikevine galegalan, galegalên ji wê havînê jî germtir.

Li jora devê avê, li lojmanên deriyê gumrikê karê min çêdibe, çay û xwarin tê ber min û … de vêca bifikirin… ez û karmendên gumrikê bi hev re li ser xwarinê rûdinin û em bi hev re dixwin. Ez rewşa hecî Elî Çiftçî ji wan re vedibêjim û li wir li bendî wî disekinim. Ji min dipirsin ka ez ê li kuderê bigerim û heta kuderê biçim. Ez jî ji wan re bi lêv dikim û dibêjim:

— Heta wan ciyê ko kurd xwediyê hukum in... ez ê heta Silêmaniyê biçim û bigerim.

Piştî saetekê ji wan xatir dixwazim ko ber bi Dehokê bilezînim. Difikirim ko xwe bigêhînim otêlekê û ji wir ji dostên Qamîşloyê re telefonekê bikim û bibêjim: »Hecî Elî Çîftçî bi şûn de vegeriya, bi tenê nehêlin.« Wek ko min got, tevgerên karmendên gumrikê li hemberî min ji tevgerên karmendan bêtir e, mîna ko ez ne tenê tûrîst an jî welatiyekî wan

im... germî û nêzîkiya wan ji evan xisûsiyetan gelek û gelekî bêtir e. Ez çi dibêjim, çi daxwaz dikim weke min dibe, bi gotineke din problem dernakeve, bi marîfet û bi hurmet in.

Bi alîkariya karmendan ez sed dolarekî xwe dikim desteyeke dînar, li texsiyekê siwar têm û ji şofêr re dibêjim: ji kerema xwe re bajo Dehokê. Ez û şofêrê xwe di riya Dehokê de ne. Şofêr torkman e, ew wusa dibêje, lê bi kurdiyeke paqij dipeyive. Di rê de, ez dilê wî nizanim, lê di sohbeta me de ez têderdixim ko ji hukmat û îdara Kurdistanê kêfxweş e. Hawurdor germ e. Germeke welê ko meriv dibê qey meriv li ser sêlê ne. Beriya ko em bajon ber deriyê otêla Sûlavê, ez dixwazim bi şofêrê xwe re xwarinekê jî bixwim. Em li ber aşxaneyekê radiwestin û dikevine hun-

dur. Hênik, modern û bêhna xwarinên xweş tê. Piştî xwarinê em tên Sûlavê.
Li Sûlavê, beriya ko ez ciyekî veqetînim, dinêrim ko hecî Elî Çiftçî li pişt min e. Ew tiştên ko di dilê min de dibêje: dibe ko li hêla Suriyê ew bêbavên mixaberatan hecî Elî Çiftçî bernedin, ew hustuxwariya min a li ser evê yekê li min wenda dibe û kêfxweşî li min diyar dibe. Em odeyekê vediqetînin, em derdikevin jor, otêl modern e. Em avekê li xwe dikin û kincên xwe diguherînin. Ji jora otêlê, di pencerê re li kuçên Dehokê, li çiyayên hember temaşe dikim, dilê min dikele û heta ko hecî Elî Çiftçî jî ji serşokê derdikeve, dinêrim ko ji wiskiya ber xwe min du duble vexwariye jî. Em telefonekê ji Mueyed Teyib re vedikin. Serê êvarê ye em
13

texsiyekî digirin û jê re dibêjin bajo studioya televîzyonê.
Şofêrê texsiyê rê dernaxe. Diyar e nû dest bi evî karî kiriye. Ew bi xwe jî welê dibêje. Di rê de, li dereke kuçê serê xwe di pencerê re derdixe û ji xortekî dipirse ka ew ê çawa rê bibe ser avahiya televîzyonê. Xort li kuçê destê xwe ber hêla jor radike û dibêje:
— Hewe rast biçe, li pêş peykerê Ehmedê Xanî bifitile ser piyê çepê û ber bi jûrî hilkişe.
Û di wê gavê de çi hîs li min çênabin ku! Xwedêyo, dibêjim, me ê ev roja xweş jî bidîta! Şofêr welê dike, li pêş peykerê Ehmedê Xanî li ser aliyê çepê difitile, bi jor dikeve û em li ber studiyoyê dadikevin. Bi silav, bi hurmet û bi marîfeta dezgehên kurdî em derbasî miqamê Mueyed Teyib dibin. Em hevdu hemêz dikin, em xêr û xweşiyê li hev dikin û em rûdinin.
Di wan du rojên xwe yên pêşîn de, li Dehokê em diçine serlêdana Bingeha Laleşê, Çapxana Xebatê, Tiyatroya Mihemed Arifê Cizîrî,

Yekitiya Niviskaran, Pirtûkxaneya Bedirxaniyan, Avahiya Wîlayeta Dehokê û Muzeya Dehokê... Li her dezgehekê jî ji haziran ne çêtir, em rastî maqûl û karmendên kurdan tên, ew jî bi germî xêrhatinê li me dikin, qedirê me digirin û rûmeteke kurdî didine me.
Li nava bajêr ez rastî polîs û asayişên kurd têm, silavê li wan dikim, bi wan re dipeyivim, wêneyên xwe û wan dikêşim û Xwedêyo... meriv kîjan xurtî û serbilindiyê bi wan re natamije ku! Ji Mueyed Teyib re behs dikim û jê re dibêm:
— Ne sûcekî pîs û mezin, lê min pir dixwest ko min sûcek bikira û ez pê bihatama girtin.
Mueyed Teyib dikene û dibêje:
— Ji asayişê dostekî min heye, ez ê jê re bibêjim bila bi delîl û îspat te bigirin, heta dadgeh û zîndanê jî bibin.
Di van du rojan de, li evî erdê Kurdistanê ji bilî tiştekî hertişt xweş, baş û bi hîsine miqedes in. Min got tiştek, belê, tenê tiştek... semînera Bedirxanê binxetî. Bedirxan yekî binxetî ye. Li hewşa Yekitiya Niviskaran ji me re welê danasîna wî dikin. Li Sovyetê xwendiye. Li ser pirsa kurd û dîroka wê. Ew ê semînerekê bide. Em li hewşa Yekitiya Niviskaran rûniştine, kamerayên televîzyonê dor li me digirin û Bedirxanê binxetî dest pê dike. Heta dawiyê jî bi zimanê erebî semînera xwe dide. Ji bo ko ecêb neyê û em harmoniya semînerê danexînin, ez û hecî Elî Çiftçî, em dengê xwe nakin. Lê di dawiya semînerê de reportorê
14

Televîzyona Kurdistanê tê, min ji beşdaran xewle dike û ji min dixwaze ko ez dîtina xwe a li ser semînerê bibêjim. Bibêjim ka li ser kurd û dîroka wê dîtinên Bedirxan çawa bûye. Ez jî li ber kamerayê disekinîm û dibêjim:

— Ez nikanim dîtinên xwe bibêjim, ji ber ko semîner bi erebî bû. Tenê ji hinek gotin û pirsên temaşevanan (wan guhdariya erebî dikirin lê pirs û dîtinên xwe bi kurdî dikirin)… belê, ji evan ez têgêhîştim ko semîner li ser çi ye. Ne dîtinên xwe, lê ez ê çend gotinan bibêjim. Û ez li pêş kamerayê dibêjim:

— Ji piçûktiya me û heta îro jî dema ko Quran tê xwendinê, ji me re digotin û hîn jî dibêjin: bêdeng guhdarî bikin. Meriv dibêje ez bi erebî nizanim û fam nakim, li meriv vedigerin û dibêjin: kelamên Xwedê ne, tiştên xweş têne gotin û tiştên xweş têne xwendinê. Îcar ez bawer im Bedirxanê binxetî jî tiştine hêja digotin û bêguman behsa tiştên xweş dikir. Lê min fam ne kir. Sê sed sal beriya niha… a ew cenabê ha (li vir ez destê xwe ber bi hêla peykerê Ehmedê Xanî bilind dikim) dibêje: ji bo ko xelk nebêjin kurmanc bêmarîfet in... radibe bi kurmancî dinivisîne. Nemaze îro û anuha li ser evî erdê miqedes dîsa bi zimanên welê semîner dibin ko tu carî me jê hez ne kiriye... û me jê fam ne kiriye. Reportorê televîzyonê wê çaxê têdigêhîje ko em bi erebî nizanin. Belê, a ev semînera bi erebî ne tiştekî baş bû.

Û êvara wê rojê, dîsa li wê hewşê û li ser şîvê, Bedirxanê binxetî jî evan gotinên min rast dipeyitîne û heta derekê belbî jî ji xwe dişikê. Lê bi rastî jî mebesta min ne ew bû ko ew ji evî kar û kerametê xwe bişikê. Min xwest ko ez vebêjim ka ez çi hîs dikim.

Sibetirê zû, dîsa bi rêber û dîsa bi şofêrekî re em berê xwe didine çiyan. Amediye bajarekî kevin û li ser pozê girekî berwarê çiyê ava bûye. Rengê avahiya bajêr kevin û mîna kelayekê ye. Xwedê dizane fikra avahiya bajêr ew bûye ko bi asanî bajêr ji êrişên barbaran biparêze. Li pişt Amediyeyê jî çiyayekî bilind û bilind. Ji jora çiyê av tê xwarê û heta jêr diherike. Li ser devê evê avê, di navbera dar û zinaran de aşpêş, nanpêj, dikan û havîngeheke hênik... Meriv naxwaze ji wan deran rabe ser xwe.

Dewlemend û şêxên ereban ji Bexdadê hatine, tev xeftanên sipî û egalên xwe yên reş li evê derê xwe dane ber hênikayiyê. Li gor rêber û şofêrê me,
ev jî tûrîstê me bûne. Ne tenê dewlemendên wan, herweha koçerên ereban jî xwe li Kurdistanê girtine û hatine li ciyên bi dar, ciyên bi av û di
15

binê çiyan de kon vegirtine. Hukmê Kurdistanê bi pereyekî sembolîk cî dane wan. Ew jî gelekî xweş û kêfxweş li wan deran dîmînin. Wusa dibêjin. Em wê rojê li nava Amediyê digerin, em vedikişin devê avê, ava ko ji jora çiyê bi deng û bi kefeke sipî weke şîr dadikeve xwarê. Li berwarê evî çiyayî, li devê avê û ber bi jor wek ko min got: dikan, nanpêj û aşpêj heta jorê weke libên tizbiyan e. Em li binê xiyamekê rûdinin, nan û goştekî ser êgir bi dew û seleteyeke çiyayî dixwin û em bi êvarê re bi şûn de vedigerin Dehokê.
Li ser daxwaza me ya ko em dixwazin biçin seredana Laleşê û bibine hecî... Xwedê jê razî be û Xwedê xêra wî qebîl bike… Mueyed Teyib haziriya me dike. Karê me dike ku: yekî ji wan karmend û kameramanekî xwe î televîzyonê ji bo hecaciya me bi me re bişîne.
2ê mehê ye. Bi jeep û şofêrekî televîzyonê, bi kameramanekî televîzyonê û maqûlekî ji Bingeha Laleşê em berê xwe didin Laleşa miqedes. Ro li taştiyan e. Di rê de nîgara çiyayên hawurdor, dîroka wan gund û bajarokên li ser riya me, zilm û zordariya Sadam Husên, şer û berxwedana pêşmergên li hemberî vê zordariyê... yek bi yek tê behskirin. Li van deran û Xwedê dizane li tevayiyê Kurdistanê, her mit û serê her çiyayekî xwediyê destaneke şer e, her dol û her newaleke evê derê gelek xwîn kişandiye xwe û pê hevîr bûye, her kevir û her zinarekî evî erdî ji qêrîn û hewarên dayikên zarokên şîr çendik û çend caran sincirîne! Xwedê ji ne-

heqan re nehêle!
Em xwe digêhînin karwanserayeke kevin û xalî. Kevin û bêxwedî ye. Dixwazim bibêjim dîwarên ji hêla der xirabe dixuye, giya û devî ji nava dîwarên wê derbûne û xwe bera jêr dane. Hundurê wê li ser sitûnên kevirîn e, avahiya zikê karwanserayê bi motîfên kevnare ye. Lê anuha bi kar nayê û diyar e ji mêj ve û anuha jî kesekî guh nedaye evê karwanserayê. Informatorê ji Bingeha Laleşê bi me dide zanîn û dibê:
— Di wexta xwe de ev xan, Xana heciyan bûye. Dema ji ciyên dûr xelk dihatine tewafa Laleşê, hesp û hestêrên xwe li vir vedihewandin û li vir bêhna xwe vedidan. Lê anuha bêxwedî ye. Zêde kes nayên, yên ko tên jî bi seyaran tên û di rojê de vedigerin. Pêwîstî bi vê karwanserayê ne maye. Ew karwanseraya ko êdî pêwîstî pê ne maye, em jî jê derdikevin û em dîsa bi jeepa xwe ber bi jor dikevine rê. Bi qonaxa kişandina cixareyekê, ji dûr ve, di nava çiyayên asê de serê qubeyên Laleşa pîroz bi me ve xuya dibe. Sipî û mîna şerpikên şîr bilind ber bi Xwedê hilkişiyane. Li wir, li
16

ber kaniya sipî çend zarok pêrgî me tên, weke hemû zarokên vê dunyayê ew jî bi çav û awurên mereqdar in. Erdên wan çîr û kej, porên gelekên ji wan bi ser sore ve ne. Cudayiyeke ji zarokên mayî ew e ko hinekî kûvî ne. Lê kûvîtiyeke pak û pakîze. Hîsên welê li min peyda dibin ko ev zarokên pak baweriya wan bi me nîne. Belê, bi çav û bi awurên welê li me mêze dikin. Ev ne ji ber ewê yekê ye ko em ji welatekî din çûne, na... lê mîna ko em û wan ne ji hevîrê teştekê ne û tenûra ko em pêve bûne nan jî ne tenûra wan e, mîna ko em ji tiştekî din peyda bûne û loma wan bawerî bi me nîne.
Di wê gavê de nivîsa mîsyonerekî rojava dikeve bîra min. Li gor mîsyonerê rojava: bi qasî ko di bîra min de ye, Pîrê êzîdiyan jê re gotiye: Em ji

hezretî Adem, lê ne ji Hewa xanimê ne. Dema ko seriyên zarokan li Adem û Hewayê dibin hejmareke heftê duduyan, a wê çaxê Abel û Kaîn radibine hev. Kaîn radihêje kevirekî mezin û pê Abel dikuje.
Li ser evê mêrkujiya cara pêşîn, Adem û Hewa li hev rûdinin, bi hev dişêwirin û bi hev re dikevine heftûheyştê. Adem dibêje ev çewtiyeke ji te
bû û Hewa xanim jî dibêje: na, çi bigire ev ji ber çewtiyeke te ye ko zarok rabûn hev... De îcar ji bo ko bizanin ka ev yeka ji wan herduyan çewtiya kîjanê ye, rabûne, her yekî ava xwe kirine kwîzekî piçûk û kirine erdê. Piştî dem û germiyeke pêwîst, Adem û Hewa rabûne çûne ber wan kwîzan ko devê wan vekin û bizanin ka çi çêbûye. Pêşiyê devê kwîzê Hewayê vedikin ko çi bibînin. Ji ava Hewa xanimê kurm û kêz çêbûne. Dû re jî devê kwîzê Adem vedikin û dibînin ko zarokekî piçûk î şêrîn tê de veketiye. Adem ewî zarokî ji kwîz derdixe, navê Set lê dike û gelekî jê hez dike. Her ko Set mezin dibe, baqil û çelengtir dibe. Set dibe xort.
Hewa xanim ji evê yekê dexesiyan dike, rojekê zarokên xwe yên mayî li hev dicivîne û ji wan re dibêje:
— Bala Adem î bavê we her li ser Set e, mîna ko tenê ew hebe, ew tenê lawê wî be. Bala xwe nade ser we. Werin hûn evî Setê ji ava Adem bifetisînin ko ew êdî bala xwe bide ser we.
Herweha Hewa xanim û ew heftê û du zarokên xwe yên mayî bi hev dişêwirên, gotina xwe dikin yek ko nîvê şevê rabin û biçin Set di xewê de bifetisînin. Beriya nîvê şevê û wê wexta diyar, Xwedê fermanê dide Cibraîl ko biçe yek bi yek pifî devê wan hemû heftê û du zarokên Hewa xanimê bike. Cibraîl welê dike. Piştî ko nîvê şevê dibe, zarokên Hewa xanimê radibin. Radibin ko li gor şêwra xwe û Hewa xanimê biçin Set bifetisînin. Lê tavilê hay ji xwe dibin ko her yekî ji wan bi zimanekî din

dipeyivin. Ji ber ko zimanê hevdu fam nakin herweha nikanin li hev jî bikin û biçin Set bifetisînin.
Li ser evê yeka Hewa xanimê, Xwedê melekekê ji asiman dişîne ko Adem wê ji xwe re bike jin. Adem li evê jina asimanî mêze dike û dibîne ko gelekî xweşik e, destê wî lê nagere û dide lawê xwe, dide Setê xwe î ko
ew pir jê hez dike.
Li gor gotina Pîrê êzidîyan, li gor evê rîwayeta wan, êzidî ji ewî Setê lawê Adem û ji wê meleka asimanî ne.
Belê, li pêş û di nava evan zarokan de, zarokên ji Adem û perîzadeyeke asimanî, ez ji kaniya sipî du mist av davême serçavê xwe, bi taseke bafûnî jê vedixwim û dû re radibim. Bi lingên xwasî em ber bi jor hildikişin, li evî ciyê pîroz mîna ko em wan ruhên pîroz neyêşinin, em hêdî hêdî û bi lingên xwasî û gavine aramî digerin. Di deriyê tirba Şêx Hadî re em bi pêyê rastê lingê xwe davêjine hêla hundur, em diçin tewafa tirba pîroz, em sê caran bi qewl û lavayên dengdar di dorê re çerx dibin, em matînên li ser tirbê di çav û eniya xwe re didin, ji wir em diçin ser tirba Şêxûbekir, destê xwe di xirqa wî ya pîroz re didin. Dû re em dadikevin mexzena ava zemzemê, ji wir jî em mistek ava pîroz vedixwin û em derdikevin.
Di dawiya dawîn de li mêvanxaneya hewşa Laleşa pîroz em rûdinin û xwarinekê dixwin, bi du piyal çay em bêhna xwe vedidin û di evê navberê de ji berpirsiyarê wir re dibêjim:
— Ez jî diwazim bibime êzidî.
Ew bi serbilindiyeke nefspiçûkî:
— Çênabe, dibêje.
— Çima çênabe, dibêjim, ez dixwazim werime sêra xwe ya berê... ez dixwazim werime ser ola xwe ya berê.

Dîsa bi nefspiçûkî, bi pişirîn wan gotinên xwe dubare dike û dibêje:
— Çênabe.
— Çima çênabe, dibêjim, ji bo ko ez bibim êzidî çi şert û peyman hebe ez ê bikim. Ko tu bibêjî, bi tewafên heft caran be, ez ê heft caran werim tewafa Laleşa miqedes. Ko bibêjî... ez dikanim heft caran xwe bi ava Kaniya Sipî bişom û jê vexwim... Ko bibêjî... bi gotineke din, şert çi be ez ê wan şertan bi cî bînim û evê yekê jî ez ji dil dixwazim.
Ew dîsa bi wan gotinên xwe li min vedigerîne û dîsa:
— Çênabe, dibêje.
— Rê li ber min negire, ya ezîz... dibêjim, bav û kalên min bi zora de-vê şûran, bi hukmê gurzan bûne misilman... ma di evê yekê de min çi 18 guneh heye? Ez dixwazim vegerim ser ola xwe ya kevin. Rê li min megire!
Evê carê mîna ko hay ji giraniya berpirsiyariya xwe hebe, destê xwe jî ber bi min vedigire û dibê:
— Çênabe, be qurban… ma tu ji min dixwazî... heşa, ez guhertinan di ola êzidiyan de bikim.... Lê înşallah heta du salan Melekê Tawus ê dakeve ruyê erdê, Ew ê herkesî xelas bike û me jî pê re.
— Baş e, dibêjim, wê çaxê sozê bide min... du salên din ez ê dîsa wer-im tewafa evî ciyê pîroz, lê wê çaxê jî heta ko ez nebim êzidî, ez ê ji vir neçim, te got erê?
— Na, dibêje, va ye tu hatî û tu bûy hecî... dilê te pak e. Înşallah Melekê Tawus ê dakeve, Ew ê herkesî xelas bike û me jî pê re.
Herweha çênabe ko ez bibim êzîdî, lê weke hecî em ji Laleşa pîroz derdikevin. Weke hecî Hesenê Metê û hecî Elî Çiftçî. A ev rengdêra pîroz me bi evî awayî girt.
Wek ko min got, piştî wan leşgerên li ser ava Şetê Cizîrê êdî sem-patiyeke min li leşger û polîsan çêbûye. Çi leşgerên ko ez li nava bajêr, li

devê deriyên ciyên fermî dibînim, ji kêfxweşiya dilê xwe silavê lê dikim û bi evê yekê jî serbilind dibim. Anuha jî dema ko em ji Laleşa pîroz derdikevin, di kuçeyê de çavên min bi du cot leşger dikeve û ez dîsa silaveke serbilindiyê lê wan dikim. Ew jî bi çavine kesên wezîfedar li min dinêrin, silava min werdigirin û ber bi jeepa xwe em ji wan dibuhurin. Di wê gavê de tavilê tiştek bala min dikişîne, sîlehên di milên wan de ne weke yên me ne, dixwazim bibêjim ne weke yê leşgerên me ne. Piştî ko em êdî di rê de ne, li ser pirsa min kameremanê me bi min dide zanîn ko ew leşgerên tirkan bûne. Ji bo gerîla hati bûne vir, ew wusa dibêje. Li ser van gotinên kameramanê me, ez hinekî narihet û hinekî jî pê dêşim ko leşgerên tirkan jî hatine evî ciyê pîroz. Li Dehokê evê yekê bi me didine zanîn ko wan hay ji wan leşgeran hene û ew bi destûra wan çûne wir. Dîsa jî narihet dibim, lê ez vê yekê didim xatirê îdara siyasî, pêwendiyên du dewletên cîran û dixwazim ji bîra bikim.

Em dixwazin Zaxoya rengîn bibînin. Em li texsiyekê siwar tên û em berê xwe didin Zaxoyê. Ji dûr ve xuya dikin, dixwazim bibêjim alayên kurdî… sor, sipî û kesk. Ne tenê li devê Deriyê Îbrahîm Xelîl, li serê girên dora bajêr, li devê pireyan, li avahiyên bilind alayên kurdî pêl didin. Ko yek ji min bipirse û bibêje xisûsiyeta bajarên çi ye, ez ê bibêjim, alayên kurdî ye ko Zaxoyê ji bajarên din cuda dike. Em li wê derê li aşxaneyekê rûdinin û xwarineke xweş dixwin, em li ser Pireya Delal digerin û dû re dîsa berê xwe didine Dehokê.

Bi serê êvarê re ceremoniya dîplomên xortê universîteyê ye, universîte ji nava Dehokê der û hinekî jî dûr e. Em dixwazin beşdarî temaşeya şahiya evê ceremoniyê bibin, em dixwazin bibin xwedîparên kêfxweşiya xwendekarên xwe yên kurd. Li meydana parkeka mezin bi qasî pênc hezar temaşevan hene. Ref bi ref, li gor beşê universîteyê reng bi reng,

xwendekarên unîversîteyê bi alayên beşên xwe tên û li pêşberî temaşevanan di rêza xwe de disekenin. Keç û xort, di binê alaya kurdî de, li ser erdê xwe, di hewşa zanîngeha xwe de, li pêş xelkê xwe, bi serbilindî, bi dilxweşî... Bi dilekî tenik xwe bi xwe dibêjim: »De ka çiyê me ji xelkê kêmtir e? Ka kê gotiye ko em ecemiyên evê dunyayê ne!«
Pêşiyê birêz Mesûd Barzanî li gor nefspiçûkiya axaftinên xwe yên hertimî, kurt û konkret behsa girîngiya unîversîteyê, xwendekarên nûgêhîştî, rola mamoste û profesoran dike û ji bo erdê Kurdistanê pîroziya evê rojê bi lêv dike. Dû re rektorê unîversîteyê û paşê jî li ser navê
xwendekaran yekî kurmanc bi kurdiyeka paqij dipeyive.
Em ji Dehokê derdikevin. Berê me li Hewlêrê ye. Em ji Amediyê, Çemê Sîriyê, Çemê Zê dibuhurin û em derbasî Geliyê Balîndayê dibin. Ji wir û pê ve Navçeyê Barzan e. Ev navçe bi çiyayên xwe, bi dar û hêşînayiya xwe ji navçeyên din hinekî cudatir e. Şofêrê me ji me re dibêje ko li vî navçeyî hêj di dema rihmetiyê Mele Mistefa Barzanî de birîna daran weke gunehkariyekê bûye. Û aniha jî weke qanûn rast kirine ko birîna daran û nêçira kewan qedexe ye. Rêya me di jora çiyayê evî navçeyî re dibuhure. Li jora çiyê em dibînin bê ew avên çemên Sîrî û çemê Zê çawa mîna maran li newqa van çiyan digere, di xwe de diherike û diçe. Ez ji şofêr dixwazim ko em li derekê dawestin ko ez çend wêneyên xweş bikêşim. Lê
şofêr bi min dide zanîn û dibêje:
— Dawestina li evan deran qedexe ye. Ko ji dûr ve pêşmerge me bibînin, ew ê bibêjin qeyê em mayîna dikine erdê. Li van deran gelek tiştên welê bûne.
Bi pirs û bi mereq jê re dibêjim:
— Kî li evan deran mayînan dikine erdê.

— Şervanên kurdên bakurî ne, dibêje û ez jî êdî naxwazim zêde dirêj bikim.
Li gundê Barzan em diçin mala... Xwedê ciyê wî kesk bike... em diçin
20
mala Mele Mistefa Barzanî, Barzaniyê ko ji piçûktiya me de navê cenabê wî weke navê pêxemberan bi me nas bû. Mala rihmetî ji bombeyên rejima Baasî di ser hev de hilweşiyaye û heta nuha jî welê hiştine. Weke yadîgariya cenabê wî ye… an jî îbreta marîfeta rejima Baasî ye ko nifşên nû û nifşên dahatû bibîne. Xwedê dizane ji ber herdu sedeman e ko ev mal welê hiştine. Ji wê derê jî em dixwazin biçin ser gorna rihmetî. Em diçin, piştî vexwarina çayekê em ji kepira ber mizgefta goristanê bi berpirsiyarekî re ber bi goristanê diçin. Xwedê bi rihma xwe ciyê cenabê wî kesk bike, gorneke nefspiçûk, ji axa mintîqa Barzan axeke soringî û herweha bi çend kevir û gomiyên evî navçeyî. Rêzeke ji sitrana Kazanci Bedîhê ruhayî tê bîra min: “Bir dunyaya sýðmaz iken Ýskender, bir mezara qayile geldi...”
Gorna rihmetiyê bi navûdeng, bi evê axê û bi evan kevirên dorê qayîl e. Ez el-fatihayeke erebî û çend gotinên ji dilê xwe di ser gorna cenabê wî de
dirijînim û em ji wir vedigerine aşxana mêvanxanê. Li gor berbora evî erdî em bi nan û xwarin dibin û dû re em ji wir jî derdikevin.
De îcar xweşikiya evê mîntîqa Barzan, Diyana, Geliyê Elî Begê...
Xwedêyo wek ko katibên pirtûkan bi lêv dikin û dibêjin: »Li evan deran nan û av nakeve bîra merivan, li evan derina meriv bêyî Xwedê û pêxemberan jî dikanin bijîn....«* dû re jî em berê xwe didin Şeqlawayê, em dikevin rêya Selahîdînê û em berê xwe didin deşta Hewlêrê. Germeke welê li evê deştê dadikeve ser me ko heta nuha jî ez pê ne jiyame. [*Ev jî gotineka lehengên çîrokeka Hesenê Metê ye, çîroka Panaroma. Nefel]

Li Hewlêrê, li otêla bi navê Çarçirayê em bi cî û ode dibin. Ev jî yek ji wan moderntirîn otêlên Kurdistanê ye. Weke hertim em pêşiyê avekê li xwe dikin, em bêhna xwe digirin, em dadikevin jêr û xwarinekê dixwin. Di van çend rojên Hewlêrê de, em diçin seredana wezîrê perwerdê birêz Ebdulezîz Teyib, em Xusro Goran dibînin û li parlamentoya Kurdistanê digerin, em diçin seredana Şukur Mistefa, Dezgeha Gulanê û Sero Qadir û gelek maqûlên din.
Di van rojan de, rojekê êvar e. Em li hewşa Çarçirayê rûniştî ne. Tarî ber bi nîvê xwe diçe û saet li dor 23ê şevê ye. Ji nişka ve dengên tivingan tariya şevê didirînin û fîşek li asiman diherikin. Dilê min bi tirs lêdikeve û Xwedêyo ev ji kengî ve ye ko min dengekî wusa ne bihîstiye: »Xwedê,« dibêjim, »Tu destê xwe bidî ber van guleyan ko kurd û kesên bêguneh jê biparêzî!« Piştî pirs û bersivên mazûbanên me û piştî saetekê, em têdigêhîjin ko şerekî di navbera asayişa bajêr û tirkmenan de ye: Komela

tirkmenan xortekî kurd kişandine hundurê komela xwe û dev û poz lê xwîn kirine. Hîn jî nizanim bê çima weha bûye, lê xortê kurd jî ji avahiya wan derketiye û çûye giliyê wan bi asayişa bajêr de kiriye.
Li ser evê yekê asayişa bajêr diçin û sûcdarên tirkmen ji komela wan dixwazin, piştî ko tirkmenên di komelê de naxwazin sûcdar teslîm bikin û gotinên beradayî bi lêv dikin, a wê çaxê asayişa bajêr li wan direşînin. Encam: du kesên komela tirkmenan dimirin û çend kes jî birîndar dibin. Ji me re welê dibêjin.
Sibetira rojê, ro li ber taştiya ye, Dr. Cemşîd Heyderî tê otêla me. Qewlê me ew e ko ew me bibe dezgeha rojnamevanan û me bi hev bide naskirinê. Li ber otêlê em texsiyekê disekinînin û lê siwar dibin. Lê beriya ko texsiya me ji ciyê xwe bilive bi qasî hejmara hawariyên Mesîh, leşgerên

kurd li me û texsiya me dicivin. Mîna ko ji binê erdê derkevin, ji asimanan dakevin... tew em nabînin bê ji kuderê digirin ser me jî. Devê keleşkofan di pencerên texsiyê re li ser me ne. Çente, huviye, nav, hûn kî ne, çi ne... û gelek tiştên weha di ser me de dibarin. Ji aliyekî ve kêfa min tê: herçiqas bi hêrs û bi dengekî bilind li me diqîrin jî lê ew kurdiya wan bi min şîrîn tê, hêza wan û gotinên wan di xwe de dibînim û di ber evê jîriya wan de serbilind dibim. Wek ko min got, ji aliyê din ve jî »Xwedê neke,« dibêjim, »ku gule ji devê lûlên keleşkofên wan biherike, an jî kamera me bigirin û di erdê de bidin...« Ji ber ko heta niha me leşker welê dîtine, belê tenê tirsa min ev e. Lê Dr. Cemşîd Heyderî bi destê xwe jî me nîşan dide, bi wan dide zanîn û dibêje:

— Emana mêwanî xuman e, kaka, xelçî bakur în, le Swîd dihînewa.

Lê leşgerên asayişê… bi gotina Dr. Cemşîd Heyderî, ew kakayên ha guhdarî nakin, bi hêrs destên xwe ber bi çenteyên me dirêj dikin, pirs li ser pirsê li me dibarin û diqîrin:

— Çi di çenteyan de heye, ka huviyên xwe derxin...

Ez pasaporta xwe derdixim, dirêjî yekî ji wan dikim, devê çentê xwe vedikim û nîşanî wî didim. Di ber re jî dixwazim ko Dr. Cemşîd Heyderî jî welê bike, weke min bike. Ji naçarî Dr. Cemşîd jî bi şermezarî, bi enirîn welê dike, huviya xwe derdixe û dibêje:

— Fermo, emin mamoste me le Unîversîteyî Selahedîn.

Xortê ko keleşkof di ser me re girtiye, dadide huviya Dr. Cemşîd Heyderî, lê mêze dike û pê re jî dibêje:

— E tu torkman î?

Xwedê dizane di ewê rewşê de xort tew nivîsên li ser nasnamê jî

naxwîne. Peyva torkman bi qasî ewan, Dr. Cemşîd Heyderî jî hêrs dike, bi gotineke din evê carê jî Dr. Cemşîd Heyderî hêrs dikeve û dibêje:

— Torkmanî çî, kakî xum, bo torkman îm!
Ez jî wek yekî sadiqtirîn û tirsonektirînê qanûnan, lê bi kêf û ser-bilindyeke veşartî ji wan re: »Baş e, can... baş e, fermo te pas... fermo, dibêjim û ew çi dibêjin, mîna yekî ko ji hukmên hukumatan bitirse, ez jî welê dikim. Xwedê dizane beriya huviya mamostetiya Dr. Cemşîd Heyderî û hecî Elî Çiftçî, ez pasaporta xwe, tev çentê xwe didime wan û beriya wan ez ji texsiyê jî dadikevim. Lê ev yeka ha ne ji tirsa dilê xwe, ji kêfxweşiya jîriya asayişa kurd û kurdbûyînê welê dikim û ez vê yekê di xwe de hîs jî dikim. Em dadikevin û ber bi dîwarê hember diçin pêş amîrê asayişê. Piştî ko amîrê asayişê Dr. Cemşîd dibîne, doza lêborînê ji me dike û sedemê evê yekê ji me re vedibêje. Dibêje: Ji ber bûyera do êvarê û rakirina cenazeyên wan tirkmenan bûye. Em dîsa vedigerin zikê texsiya xwe.
Piştî seredana dezgeha rojnamevanan û du sê ciyên din em vedigerine otêla xwe.
Sibetira rojê ez û hecî Elî Çiftçiyê me î Anatoliya Navîn, em li erdekî kurd, li bajarekî ji wan kevintirîn bajarên dunyayê ne. Hewlêr. Evê rojê jî li ser daxwaza xwe em dixwazin bi tenê bin. Li nava bajêr, lê jêra Kela Hewlêrê, li meydanekê ez xwe xweş dikim, ez xwe vedikêşim, berepaş diçim ko tevayiyê jêra kelayê têkeve ber kamera min. Lê nabe, kamera hemûyê nahewîne û ez berepaş heta dîwarê avahiyekê vedikişim. Beriya ko bergaha kelayê di kameraya xwe de bi cî bikim, ji nişka ve yek bi milê min digire, kamerayê ji dest min digire û:
— Were, dibêje, were derkeve jûrê!
Ez pêşiyê baş tênagêhîjim çi ye, lê li jûra wê avahiyê li oda asayişê têdigêhîjim ko ew jî ji asayişê yekî sivîl bûye. Ya rastî li vir dostê min î ezîz, Mueyed Teyib dikeve bîra min ko eva henekeke wî be. Ji ber ko tiştê ko ez li wir dikim ne sûc û ne jî gunehkariyek e. Ez welê dizanim. Li Hewlêrê

ye û em ji xwe re digerin, ez dixwazim wêneyekî bikêşim û hew. Lê dîsa jî ez evê yekê didim xatirê bûyera do êvarê, pê kêfa min tê û ez jî dipêm ka ev girtina min ê bi çi rengî bibe. Lê piştî silav û du sê pirsan, em ji hev fam dikin û em bi hev dizanin. Avahî, avahiya asayişê bûye, kêşana wêneyan li ber avahiya asayişê qedexe bûye. Mixabin, evê carê jî girtineke ne bi dilê
min dibe. Piştî hevnasiyê em xatir û silametiyê ji wan dixwazin û ji wir derdikevin. Em derbasî hêla nava Kela Hewlêrê dibin. Li hêla hundurê
23
kelê çend avahiyên kevin û kerpîçî bala min dikişîne, lê zêde jî ne. Mêzekirina li evî bajarê kevin ne bi têra xwe ye. Ji bilî deriyên kelê zêde jî tiştekî kevin û girîng ne maye. Bi daxewa!
Piştî heyşt rojekî, serê sibê zû em ji Hewlêrê derdikevin, em zû derdikevin ko germ negire ser me. Em û şofêrê xwe î bi navê kek Ezîz. Berê me li rohilat, em ber bi Silêmaniyê diçin.
Di sînorê hukmê PDK û Yekitiyê de kontrol heye. Kontroleke welê ko divê meriv ji texsiyê jî dakevin. Hecî Elî Çiftçî û şofêrê me ber bi niqta kontrolê hildikişin, pasaportên me nîşanî wan didin û tên. Kontrola di navbera evan herdu hukmên kurdî de, bi şofêrê me dane zanîn ko li hêla Yekitiyê tiştek were serê me, ew ne mesûl in. Em ji ewî sînorê sînoran derbas dibin. Di navîna herdu sînoran de bi qasî hukmê tifingeke birnoyê erdekî vala heye û li ba me li Swêdê jê re dibêjin »ingem-anasland«, xwe bi xwe: dêmax ev valayî jî ev e, dibêjim, ji cixara xwe yekî agir dikim û yekî jî dîsa keremî kek Ezîz dikim. Beriya ko em bikevine erdê şaîrê gewre Hecî Qadirê Koyî dîsa kontrolek. Ji Hewlêrê heta evê kontrolê min hejmart, rasterast yanzdeh caran em sekinîne û me bersiva pirsên kurt û dirêj dane.
Li evê kontrolê jî divê em tiştekî mîna vîzeyê bistînin. Karmend,

berpirsiyar, dezgeh û hertiştê evî aliyê hukmê kurdî, bi gotineke din hukmê Yekitiyê... nizanim çima lê ev aliyê hukmê Yekîtiyê bi min germtir, dostanetir tê, ji hukmekî bêtir mîna ko rasterast meriv di hewşa malê de be, hîseke welê li min çêdibe. Du nobedarên devê sînor me disekinînin, bi silav û rojbaşî ji me dixwazin ko em dakevin û kaxizeke destûrê bistinin. Em dadikevin. Hênikiya sibehê hîn jî ji hukmê xwe ne ketiye û ro li taştiyan e, di devê evê riyê de bi mebesta deriyê erdekî din, karmendan kon û kepir vegirtine û navê gumrikê lê kirine. Ji karmend, leşgerên »sînor« û mifrezan hinek kes li derve li ser textan hîn jî di xew de ne. Baş diyar e ko yên di xew de nobedarên şevê bûne. Em derbasî kepirekê dibin, rengê bîstanan û bêhna xiyar û petêxan dide der. Karmendekî şêrîn, belbî jî bi pênc an jî heyşt salan ji min piçûktir li ber maseyekê ye, me dibîne, bi marîfet radibe ser xwe, rojbaşiyê li me dike, ciyekî keremî me dike û dibê:

— Beyanîtan baş... be xêr bêyn, fermoyîn… dibêje, û em pirsa hevdu dikin, em dikevin galegalan. Dû re bi min dide zanîn ko soraniya min baş e û ji me dipirse ka em xelkê kuderê ne. Bi sipasî pê didime zanîn ko ez ji ji Diyarbekirê me û ev dostê min î hecî Elî Çiftecî jî ji kurdên Anatoliya

24

Navîn e. Nizanim çima lê wan jî li başûr paşnavê wî bi vî awayî bi lêv dikirin. Dû re li gotinên xwe zêde dikim:

— Axir… xom soranî Diyarbekir im, dibêjim û pê didime zanîn ko bakurê nava bajarê Diyarbekir hemû bi soranî dipeyivin. Ji taxa Mêrgahmedê û berjor heta malên Seyrantepe soraniyeke baş, ji min jî baştir dipeyivin. Ez jê re welê dibêjim. Ji bo ko ji min bawer bike, ez jê dipirsim û dibêjim:

— Diyar e, xoyît Diyarbekir nedîtûwe?

Ew welê jî bawer dike. Bi mereq û dilpekiya ko ew anuha bi soranekî

Diyarbekir re dipeyive destên xwe li herdu aliyan vedigire û:
— Na wulleh, nemdîtûwe, dibêje.
Piştî ko êdî fam dike ko em kî ne, ji kuderê ne, hurmeta wî bêtir dibe û ji me dipirse ka me şûtî divê an ne.
Ez pê didime zanîn ko ev erda, ev sibeha, ev bextiyariya û ev sînora... bêyî zebeş nabe. Bîne, dibêjim.
Ji me re zebeş tîne û li evê destê sibeha nêzîkî Koyê, em zebeşê xwe dixwin, weke vîze em serî heryekî me sed û pênce dînarekî didin, bi xatir û bi henek em ji wir jî derdikevin. Di derketinê de jî ez jê re nabêjim ko min henek û yariyeke diyarbekirî li te kir, ez nabêjim ko di wextekê de nêzî sê salan ez jî li evan deran di nava hêzên pêşmergan de mame û soraniya xwe ez welê fêr bûme. Na, nizanim çima, lê ez van tiştan jê re nabêjim. Bila li min bibore.
Beriya ko em di Koyê re bibuhurin ji şofêrê me dipirsim ka ew gorn an jî nîşaneka ji ciyê rihmetiyê Hecî Qadirê Koyî dizane, an ne. Em dixwazin biçin ser nîşaneke cenabê wî, ez dizanim ko gorna rihmetî li dereke Îstenbolê ye û ne li vir. Lê şofêrê me bi me dide zanîn ko ew nizane. Em derbas dibin û berî berî çiyayê Gosretê ber bi Silêmaniyê dikişin. Ber bi nîvroya wê rojê, li ser pêşniyara dostekî, em li ber derê otêla Ebû Sena dadikevin û
em ji şofêrê xwe re dibêjin piştê sê rojan, sibê zû were ko em di hênikayiyê
de ji vir derkevin. Me rojên xwe wusa rêz kirine.
Karmendê otêlê ji me dixwaze ko em biçin û ji asayişê kaxizekê bînin da ko odeyekê bide me. Bi me dide zanîn ko bêyî kaxiza asayişê çênabe. Hecî Elî Çiftçî dixwaze em jê re bibêjin ko em mêvanê kê ne û em kê nas dikin, dixwaze em jê re bibêjin ko em ji otêlê telefonekê ji wan re vekin ko bila ew ji xwediyê otêlê re bibêje û cî bide me. Lê ez dibêjim: “Na, evê

carê em weke xelkên adî ji xwe re cî veqetînin ko em bizanin ka ev tişta çawa dibe.” Eviya ez ji hecî Elî Çiftçî re bi swêdî dibêjim. Bi gotineke din
25
ez dixwazim em tiştekî mîna tebdîl-î qiyafet bikin. Ji bo me jî reng û lezetek e ko em pê bizanin.
Ez vedigerime ser xwediyê otêlê û bi awayekî westiyayî dibêjimê:
— Axir ezanî çone, kaka... bi Xwa ême zor mandî bûyîne. Lem ger-mawa wereqey asayîşî le kwêy bînîm?... çon bînimewa?...
Ew jî li min vedigerîne û dibê:
— Axir ême natiwanîn, kaka, seyarekey bîgireyn û ta cigayî asayişê biron, werqekey xoy bêynin... înca tewaw.
— Baş e, dibêjim.
Em valîzê xwe li wir dihêlin. Em dadikevin pêş otêlê, em seyarekey xo weregirên û em pê didin zanîn ko me bibe asayişê. Şofêr me ber bi wir dibe, em di rê de bi wî re dikevin galegalê û em serwextî hev dibin. Ez ji Diyarbekirê, dostê min jî ji kurdên Anatoliya Navîn û wek ko şaîr jî dibê-je: Lêre jî Silêmanî ye. Belê li Silêmaniyê, li ber derê asayişê şofêr naxwaze peran ji me werbigire.
— Êwe mêwanî xuman e, emin parey le êwe wernagirim!
Şofêr sond dixwe ko çênabe ew peran ji me bigire, em mêvanên wî ne. Ew wusa dibêje. De îcar perê texsiyê jî... li Kurdistanê: nava bajarên Dehok, Hewlêr û Silêmanîyê pênc dînar e. Ez bi sond û bi zorê bîst dî-naran di destê wî de datînim. Em bi sipasî xatir jê dixwazin û em dadikevin ber deriyê asayişê. Hewşeke fere ye, weke garnîzoneke mezin e.
Hemî jî kincên leşgeran li wan e. Em ji avahiyekê derbasî yeke din û ji çaviyekê derbasî yeke din dibin. Bi silav, bi kêfxweşî ew çi ji me dipirsin, çi ji me dixwazin em jî hemûyî bi awayekî rast û vekirî dibêjin. Rasterast

wek hevwelatiyekî qenc. Li tu ciyekî din, li hemberî dezgehên fermî û eskerî, weke yekî ji xelkê heta nuha jî min welê rast, welê vekirî û bêyî hîsên dudilî tişt ne gotiye. Bi gotineke din, heta nuha li ciyên welê û di rewşên welê de min hinek tiştên xwe çewt û bi awayekî veşartî gotiye, di hinek rewşan de min çewt ne goti be û derew ne kiribe jî min bi tirs gotiye: Nav û paşnav, navê dê û bav, ciyê ko ez jê me, ciyê ko ez lê me, ez ê çi bikim, çi difikirim... Lê ez bala xwe didimê ko li evê derê pêwîstiya min ji gotinên çewt, Xwedê neke para kesekî û heşayî we… pêwîstiya min ji derewan tuneye, gelek rihet û serbilind dibêjim. Evêya ez li vir hîs dikim û ez bi lezeta rastgotinê dihesim. Ez pê dihesim ko meriv çiqas rihet e dema ko dudilî li meriv tune be.

Vir dibêjim, qest û mebesta min li herdu aliyan jî welê ye, lê li hêla Partiyê rewşa me dest ne da ko em wek xelkên normal bidin û bistînin.

26

Li hêla Partiyê, li her deverê em weke fermî û nîvfermî bûn loma îmkaneke welê ne ket destê me ko em dakevin deriyê asayişê û wekî anuha bikin.

Em ji avahiyên asayişê derdikevin, em dîsa li texsiyekê siwar tên û em tên ber otêla Ebû Sena. Em odeyekî vediqetînin û derdikevin jor. Li jor em avekê li xwe dikin û telefonê ji resepsiyona otêlê re vedikin ko ji me re

xeta hejmarekê veke. Ew xetê ji me re vedikin û ez jî li birêz Mulazim Emer digerim. Yek derdikeve û dibêje:

— Êsta le êra niye, kaka, cebabit?

Ez cenabê xwe jê re dibêjim û ez bi yeka din re dipeyivim. Dû re em dadikevin jêr, li salona rûdinin û li bendî ne. Piştî nîv saetekê em dinêrin ko pêşiyê texsiyeke reş disekine, texsiya asayîşa imûmî ye. Du kesên bi sîleh dikevine hundur, li pişt wan jî Xecê Xan. Mêvan û personelên otêlê

bi hatina wê re bi giramgîrî radibin ser lingan. Ez bawer im di wê gavê de karmendên otêlê fikirîn ko wan çima ji bo wereqa asayişê em heta asay-işê şandin. Dû re jî di wan sê rojan de her cara ko em bi tenê jî dihatin otêlê, ew personelên wir bi giramgîrî ji ber me jî radibûn, herwekî ko em merivine mezin bin.

Li Silêmaniyê, em diçin serlêdana dezgeha Gelawêjê, em diçin seredana rojname û Televîzyona Xakê. Hêro Xanim xêrhatineke germ û dostane li me dike, ode bi ode, studiyoya televîzyonê, kar û programên ko çawa amade dibin, yek bi yek ji me re bi kêfxweşî behs dike, dû re bi ken li gotinên xwe zêde dike û dibêje îmkanên me ev in. Di wan rojan de Mam Celal Talabanî ne li Kurdistanê ye.

Di van sê rojên xwe yên li Silêmaniyê, ez û hecî Elî Çiftçî, em carekê bi tena serê xwe derdikevine bajêr. Li Silêmaniyê dema ko ro ji taştiyan dişikê û ber bi nîvro bilind dibe, ji germê meriv nikane li derve bisekine. Nemaze kesên mîna me, kesên ko hînî germeka welê ne bûne. A wê çaxê jî ji bilî caris û xwedîkaran herkes vedikişin ciyê hênik. Em li Silêmaniyê li nava bajêr in. Hecî Elî Çiftçî dixwaze em biçin otêla xwe, em vekişin hênikayiyê. Lê ez wek carisekî dibêjim na. Xwedê dizane di tevayiya rêwîtiya me de, tenê ev tişta ye ko ez û hogirê xwe î rê, hecî Elî Çiftçî, me li ser li hev ne kiriye: Ez dixwazim biçim li Baxê Giştî li binê daran xwe bavêjime erdê û bixewim. Ew jî dixwaze em biçin otêlê.

— Baş e, dibêjim, tu biçe li otêlê rakeve, ez ê jî biçim Baxê Giştî. Saet li şeşê êvarê em li ber peykerê Yilmaz Guney hevdu bibînin.

Em welê li hev dikin û ez berê xwe didim nava darên Baxê Giştî. Yek bi

27

yek diçim û dîsa li wan hemî peykerên ezîz û hunermendan dinêrim, ji bo paldayînê, binê darekê ji xwe re hildibijêrim, li erdê, li ser piştê xwe dirêj dikim, şekalên xwe didime binê serê xwe, cixareyekê agir dikim,

hêdî hêdî bi serbilindî dûyê wê ber bi Xwedê pif dikim û dikevime ramanan. Xwedêyo dibêjim, erd, dar, sî û ev asimanê ko anuha di ser min re ye... belê ew jî êdî asimanê me kurdan e. Çi tiştekî xweş e! Di vê xweşiyê de, di kelekela germa Silêmaniyê de li binê darên Baxê Giştî bi nîv saetekê beriya wexta xwe şiyar dibim. Na, min şiyar dikin, ji dengê zarokan şiyar dibim, zarokên ko bermotê difroşin. Bi çend gavan ji min dûr du zarok heryekî sandoqek di milên wan de li min û hawurdorê dinêrin. Li dor salên deh û yanzdehan e. Ez radibim ser xwe, rûdinim, xwîna min li wan dikele û ji wan re dibêm:

— Tahal werek, şitexlek erebî?

Bêyî ko bizanim ka ev erebiya min rast e an ne, dixwazim ji wan re bibêjim: Hûn bi erebî dizanin? Zarok li hev dinêrin û yek ji wan ji yê din re dibê:

— Çî elê?

Ez dîsa deng li wan dikim û dibêm.

— Baş e êwe bi kurdî ezanin?

Yekî ji wan dibê:

— Ballê.

— Baş e, êwe çî efroşin?

— Çilûre...

Em li hev dikin, ez hinekî din jî bi wan re dipeyivim, li saeta xwe mêze dikim, radibim ber bi peykerê Yilmaz Guney û diçim. Hecî Elî Çiftçiyê Anatoliya Navînî di wexta xwe de hatiye.

Li Silêmaniyê serê wê êvarê em berê xwe didin Mizgefta Gewre û li wir bi destmêj em diçin ser gorna Şêx Mahmûdê Berzencî. Seydayek û çend xortên din jî di mekanê Şêx de ne. Piştî silaveke Xwedê, ez destê xwe vedigirim, di dewsa fatîheyeke erebî de ez dîsa gotinên di dilê xwe de jê re dibêjim: »Şêxê min, ez nizanim sewta dengbêj gêhîşte cenabê te an ne.

Sewta ko li pey cenabê te bilind dibe û dibêje: »Hawara tirkan dûr e kurd xayîn e, Şêxê min!«* [Straneka Kawîs Axayî ye ko li ser Şêx Mehmûdê Berzencî hatiye gotin, Nefel] Lê ez ji cenabê te re vebêjim... îro... piştî ewqas wext, îro jî ew hawara tirkan li me bûye agir û ferman û... û kurd jî hîn wekî xwe ne, Şêxê min!

Em sê roj û sê şevan li Silêmaniyê dimînin. Lê ji wan hersê şevên

28

Silêmaniyê em du şevan li Serçinarê dibin mêvanên maqûlan: Şêrko Bêkes, Mulazim Emer û Xecê Xanê.

Şeva sisiyan Xecê Xan li gel parêzgerên xwe tê û me bi xwe re dibe mêvandariya malekê, malake ededî. Ji rengên sivîliya ehlên bajarê Silêmaniyê belbî jî rengekî herî xweş seredana evê malê ye, ji bo min. Weke malmezinên ji eşîra Baban, em bi nan û şîv, bi qedir û rûmet dibin. Derengî şevê ye, em ji wê malê derdikevin, me hinekî jî vexwariye, kêfxweşî û serxweşiya Xecê Xanê li nav hev ketiye, fermanê dide şofêrê xwe û dibê: “Ba biroyn Ezmîn.” Berê me li derveyî bajêr e, saet li yek û nîvê şevê ye, nîşana qurxa meha 8an li ber zê ye. Xecê Xan dikene, distirê, tiştên dûr û nêzî aqilan dibêje û şofêrê wê ber bi tariya çiyayên jor dajo. Di niqtên kontrolan de texsiya me giran dibe, lê li nuxteyan nasekine. Bi silav û bi îşaret jê dibuhure. Em hildikişin Ezmînê. Li wir li evê saeta duduyê şevê Silêmanî dişewute, weke teşteke mezin ko te agir tê de daniye, ji lambeyan dişewite. Mîna ko kêfxweşî û serxweşiya Xecê Xanê têr neke, kewkeliya şaîriyê jî davêje ser ruhê wê û ji Hacî Qadirê Koyî helbestekê dibêje. Li ser Silêmaniyê ye.

Serê sibê zû em ji Silêmaniyê derdikevin. Şofêrê me dîsa ew ê berê ye. Ew ê ko em ji Hewlêrê hanîn. Bi navê Ezîz e. Dema ko em ji Silêmaniyê derdikevin, li derveyî bajêr li gor rêdara îdarî divê xwediyê texsî û kamyonan baca rê bidin. Em disekinin, karmendên baca rê tên ber şofêrê me

û şêst dînarî jê dixwazin. Lê kek Ezîz bi wan dide zanîn ko em mêvanê televîzyonê ne, ew ê me heta Koyê bibe û bi şûn de vegerîne. Di wê gavê de dilê min ji Ezîz î şofêrê me li hev dikeve û dikim ko li ba wan karmendan jê re bibêjim: “Tu derewan dikî, em naçin û venagerin…” lê ez evan gotinan nabêjim. Û Xwedê dizane ji bo ko şermezarî çênebe, ez evê yekê nakim. Ezîz pênc dînarekî dirêjî karmend dike û bi rê dikeve. Ez bêtir ditengijim û êdî cixara xwe bi tenê dikêşim. Beriya evê bûyerê her cara ko pakêtê ji bêrîka xwe derdixim, qedirê wî digirim û cixara pêşîn îkramê wî dikim. Lê piştî vê bûyerê, na, ez nakim. Dixwazim bizane ko ez ji çewtiya wî tengijîme. Lê kek Ezîz tênagêhîje, an jî ez welê têderdixim. Loma dû re jî ez xwe nagirim û dibêjime wî:

— Erê tu Xwa bo wa ekî, ka Ezîz, bo dilêy ke ême ta Koyî eron o diwayî bo Silêmanî digerinewa?

Kek Ezîz di neynikê de li min dinêre, lê gotin jê nayê der. Ez dibêjim:

— Axir çênabe ke ême weku kurd karmendên xoman bîxapînin, diroyan li ewan bikeyn. Ezanî çone. Ko emana mamûrî Sedam an tirk beyn...

29

balam zor şitekî naxoş e eger ême rabîn bo mamûrî xoman diroyan bikeyn, têegêy?

Ez nizanim têdigêhîje an ne, lê Ezîzê şofêrê me dengê xwe nake. Tenê li min dinêre û ez ji awurên wî têderdixim. Têderdixim ko anuha dibêje: ev ajanê Mam Celal e.

Di rê de li nêzîkî Hewlêrê li milê çepê daran diçînin. Ez pir dixwazim ko ez ji kak Ezîz re bibêjim raweste, raweste ko weke xêr û bîranîn ez jî biçim û çend daran daynim. Lê ji ber vê bûyerê, dilê min jê dimîne û ji bo evî karê pîroz jî jê re nabêjim bisekine. Di tevayiyê gera me de tenê ji evê bûyerê bi vî rengî narihet dibim. Û em xwe digêhînin Hewlêrê.

Li otêlê em dibîhizin ko Muayed Teyib ji bo seredana me û birêz Mesûd

Barzanî wext veqetandiye. Zû bi zû em bi aveke Hewlêrê toza Silêmaniyê ji xwe paqij dikin, em kincên xwe diguherînin, em bi texsiya fermî û bi Mueyed Teyib re berê xwe didin Selahedînê, palatsa presîdentiyê.
Piştî çend derî û parêzgeriya wan, em bi texsiyê derbasî hewşa palatsê dibin. Em hildikşin jor û li salona jora palatsê. Cenebê Mesûd Barzanî pêrgî me tê, destê me digire, xêrhatineke germ li me dike, ji presîdentiyê bêtir, bi marîfeteke mîr û kurmancên berê dide pêşiya me û em diçin jora meqamê wî. Li jora meqamê xwe jî li gor marîfetê em li hêla jor in û ew jî li kêleka me ye. Bi gotineke din dîwana wî li gor jora odê li kêlekê ye û dîwança mêvanan jî li jorê dikeve. Eviya jî ez didim xatirê marîfeta meziniya mezinên kurdan. Û dîsa bi rengekî germ xêrhatinê li me dike, li rewş û rihetiya me dipirse.
Bi qasî 45 deqeyekî em li ba cenabê wî rûdinin û bêyî ko em têkevin gotinên siyasî, em dipeyivin. Pirsa gera me dike, ji me dipirse ka me rewş çawa
dîtiye. Ez jî li ser navê xwe pê didime zanîn û dibêjimê: »Kî ji bo silametiya Kurdistanê du keviran bide ser hev, li ser nefsa xwe bibêjim, bi yekî wek min jî dikeve ko were û wan keviran tewaf bike.« Dû re em li ser televîzyonê û latîniya kurmancî dipeyivin: Dîsa li ser nefsa xwe pê didim zanîn ko em kurdên hêla bakur û ew hemî kurdên ko bi pîtên erebî nizanin... ew ê nikani bin weke nivîsên pîtên erebî televîzyonê temaşe bikin. Ew jî bi awayekî germ nêzîkiyê li evê mijara kurmanciya bi latînî dike û dibê: »Ew karê zimanzanan e, em pê kêfxweş dibin ko karê xwe bikin û têkin xizmeta
gelê xwe. Em kêfxweş in ko anuha me kitêbxaneyeke bi navê Mala Bedirxaniyan heye ko bingehê latîniya kirmanciyê danîne.«
Ez nizanim çawa dibe, lê dû re Mueyed Teyib gotinê vedike û tîne ser
30

bûyera min a ser avê. Ew ji cenabê Mesûd Barzanî daxwaz dike ko guhdarî bike bê ez çawa ji avê derbas bûme. Ji naçarî ez jî êdî behsa ewê bûyera xwe û ser avê dikim. Ji cenabê Mesûd Barzanî re:
»Li ba me û ez welê bawer im di tevayiyê kurmanciyê de jî welê ye… Di kurmanciyê de ne minasib e ko av bi çavên mêran bikeve.« dibêjim û wê bûyera xwe ya li ser devê Şetê Cizîrê behs dikim, bûyera ko êdî xwendevan jî pê dizane. Lê bala min dikişîne ko di dawiya vegotina evê bûyera min de çavên wî jî tije dibin. Ez wer bawer dikim, ji bo ko ez zêde li xwe negirim: »Na, mêr jî digirîn, lê ne ji bo wan tiştên ko jin ji bo digirîn.« dibêje û ji me re behsa axaftina xwe ya pêşîn û parlamentoya Kurdistanê dike. Behs dike ko di civîna pêşîn de, li pêş hemî palamenterên kurd di parlamentoyê de dilê wî rê ne daye wî ko axaftina xwe heta dawiyê xelas bike. Ji min re dibêje ko belbî ew ji min jî xirabtir bûye. Evê hîsa wî ez gelekî baş têdigêhîjim. Piştî 45 deqeyan û evê hevdîtina me ya sade, germ û dostane bi destûr em ji ba cenabê Mesûd Barzanî radibin. Di rabûnê de ew dîsa dide pêşiya me heta salona jor bi me re derdikeve, li wir jî dîsa bi germî û bi dostanî destê me digire, sitara Xwedê li me dike û em ji wir dadikevin aşxana palatsê.
Ko ez li xwe mikûr werim û cenabê Mesûd Barzaniyê vê kurtedemê vebêjim, ji presîdentekî bêtir mîna dost, mîna bira û mîna mezinekî ji malê, bi marîfeteke kurd û kurmanciyê... bi min welê hat. Eva jî ew tiştên ko min ji dûr û nêzîk ve pê dizanî û dipa, jê gelekî zêdetir bû.
Li aşxana palatsê bi qedr û rûmet em firawînê dixwin. Li pêş min jî kek Sîdat rûniştiye. Ez pêşiyê nizanim bê kî ye, lê gelekî bala min dikişîne. Meriv dibêje qeyê hîkmeta Xwedê, cenabê Mele Mistefayê Barzanî ji gornê derxistiye an jî ji asimanan daxistiye, bi qasî 50î salî ciwan kiriye û daniye evê derê. Dirûvên wî gelekî li gorbihiştê mezin dima. Bi kêf, bi henek em bi wan kesên palatsê re nan dixwin. Piştî firavînê em ji wan jî

xatir dixwazin û li ser nefsa xwe dibêjim, bi hîsine gelekî tevlihev û ser-
bilind em ji wê derê dîsa ber bi otêla Çarçirayê tên.
Sibetirê em vedigerine Dehokê. Em wan dost û nasên xwe yên kevin
dibînin, em xatir ji wan dixwazin û em dîsa berê xwe didine Şetê Cizîrê.
Şetê ko em ê dîsa bi kelekê lêkevin û derbasî hêla rojava bibin. Em welê
dikin. Em karûbarên xwe yên brokratîk li deriyê gumrukê diqedînin. Em
dadikevin devê şetê Cizîrê. Dema ku em digêhîjin nava avê, li pişt xwe
mêze dikim û di dilê xwe de dibêjim: “Xwedê zarokên gelê kurd û wan
31
hemû kesên bêguneh ji xirabiyan biparêze.” Em derbas dibin û diçin li
Qamîşloyê li ber otêlekê disekinin. Her çiqas ne bi dilê kurdên me yên
binxetê ye jî, em welê dixwazin û em bi alîkariya Konê Reş ji xwe re
odeyekê vediqetînin. Xwediyê otêlê pîremêrekî bi sal e, odeyeke kêleka
oda me nîşan dide û bi erebî dibêje gelek salan ji mala Cemîl Paşa Dr.
Qasimê Muxdat di evê odeyê de ma.
Sibetirê em bi otbusekê berê xwe didin Helebê. Li wir jî em gelek kesên
bi qedir û bi rûmet dibînin û derengî şevê em berê xwe didin Şama Şerîf.
Em diçin otêlekê, em li wir xwe bi cî dikin û dest bi karê derketina xwe
ya ji Suriyê dikin. Me du roj hene. Di wan du rojan de em li gelek ciyên
Şamê digerin.
Li ser tirba Selahedînî Eyubî, dikevim ramanan bêyî ko hecî Elî Çiftçi
bi xwe bihesînim, di dilê xwe de: »Ya Siltanê kurdan,« dibêjim: »Em çûn
û va ye em hatin jî. Mizgîniya me li cenabê te. Marîfeta îdara erd û
dewletekê li ba me kurdan ne kêmî xelkê ye… xelkên ko pêxember derx-
istin û xelîfe bi dû xwe xistin, em ji wan ne kêmtir in. Ez bi navê te sond
dixwim ko em ji wan ne kêmtir in, ya Siltan!«
Min xwest ez ji bo gorn û ruhê Siltan hinek tiştên din bi lêv bikim, lê
min ne got, min got bila ji devê min nebihîse, min got ew ê aniha ji gor-

na xwe rabe û dîsa bibêje: “Xwe di ser xelkê re megirin!” ew ê bibêje: “Gotinên welê bi me kurdan nakeve.” Bi gotineke din min dikir ko ez li ser tirba wî bibêjim: »Ev nimûnên weha jî dide zanîn ko kurd pir jîr in, jîr in ko zû bi medeniyeta nû rabin û xwe adapteyî pêşveçûnê bikin. Li ser vê yekê kurd ji tirk, ereb û eceman pir û pir bilindtir in.« [Edward William Charles Noel, Nefel]
Lê wek ko min got, ez van gotinên xwe ji kêla cenabê wî re nabêjim. Û diyar e ev yeka ha ne tenê îro welê ye, do jî her welê bûye. Bi gotineke din,
kurd ji xelkê ne kêmtir bûne.
32
**

ÇEND RÛPEL JI DIROKA GELÊ KURD

Weşan no: 7
Utgivare: Apec-Tryck & Förlag
Çap û Weşanxana APEC
Nivîskar: Dr. K. Mezher Ehmed
Werger: Elîşer
Adress: Apec-Tryck & Förlag
Spêngavêgen 345
Box 3318 163 03 Spênga/SWEDEN
Tel: 08-761 81 18 Fax: 08-761 24 90
ISBN: 91 87730 11 1
DR. K. Mezher Ehmed
ÇEND RÛPEL
JI DÎROKA
GELE KURD
Werger: Elîşer

STOCKHOLM 1991

Daxuyanîya Weşanxane

Ev kiteba deste we ya dîroknase heja Mamoste Dr. Kemal Mezher Ehmed e ku orîjînalê we bi Zarava Soranî (Kurmancîya Xware) bi nave "Çend Lapereyek Le Mejûwe Gele Kurd" (beşe yekem) di sala 1985'an de li Iraqe hatîye çapkirin. Di wergerandine de hin metnen wergere yen ku ji rojname û kovaren Kurdî (her wekî rojnama Kurdistan) hatine stendin ji bo wergerandinek hîn tekûztir cebe, kara dana wan ber orîjînalan ji alîye Mamoste Malmîsanij de hatîye kirin. Em li vir sipase xwe je re dikin.

Kiteb ji şanzdeh gotaren Dr. Kemal Mezher en di cûda cûda deman de hatine nivîsandin pek tê. Her yek ji van gotaran bi sere xwe quncikek dîroka gelê me yen di tarîtîye de mayîn di¬din ronîkirin. Bi kurtî mirov dikare bêje her yek ji van gotaran ji me re wek kitêbek in.

Beguman afirandinen Dr. Kemal Mezher ne ev tene ye. Bi dehan gotar û kiteben wî yen gelek hêja yen di ware lekolîna dîroka Kurdistane de hene. Le gelek mixabin ji ber bikaranîna alfabek cûda, heta îro, nemaze xwendevanên Kurdistana bakur nekarîne îstîfade ji van afirandinen heja bikin.

Ji ber ve em dibejin ku gava xwendevan ve kiteba deste xwe de bixwîne biqedîne em bawer dikin we ew jî bigihîje we qeneete ku bi çapkirina Kurmancîya we, me çawa karekî di cih de kirîye. Ger xwendevaren heja beşdarîya ve nerîna me bike em xwe bextîyar dihesibînin.

PEŞKEŞ E JI BO BINEMALA SERBILIND

A KERÎME HELEKE !

PEŞGOTIN

"Çe'nd Rûpel Ji Dîroka Gele Kurd", ji beşek wan gotaren min en di derbaren cûda ya dîroka Kurd en di çapemenîyen Kurdî de min weşandî, pêkhatine.

Gotaren wisa tê de henin ku temenê wan digihîjin çarîk sedsalek, li gora bawerîya min hemû jî hêjan e. Ji ber ve yeke min pêwist zanî wan berhev bikim û carek din ji nû de peşkeşe xwendevaran bikim û bi vî êwayî jî ji fewtandinê rizgar bi¬kim.

Di hinek cîyên gelek pewîstî nebe, min dest neda naverok û renivîsa gotaran, di gelek hêlan de weşandina bi vî awayî baştir e. Lê min bi naçarî hinek cîyan jê debdst yan hinek guherand!.. Evên han jî tene di hêla sikle nivîsandina mijaran de guherandin kir.

Ez hevîdar im bi ve berhemê bikarim xizmetek pêşkeşî xwendevarên Kurd ên xoşewîst bikim. Eva demek bû jî min dixwest gotarek di derbarê Kerîmê Heleke yê Wezîrê Darayî ya Şêx Mehmud û cîyê dîyar a vê binemala serbilind binivîsim, lê carek bila ev dîyarîya min a han di cîyê wê de be. Bereketa Xwedê nave be, di saya Xwedê de şûnewarê Kerîme Heleke winda nebû... Tu bêjî yek ji wan Kurdan heye ku Mamoste Mesîh Iskender binase û bi dilek xweş rêzê jê re negre. Qet dûr nîne ger Mesîhê mezin zindî be, de deste xwe ye pîroz bi sera wî de bîne û jê re bêje:

"Ez bextewar im mirovek wek te hilgirê navê min e!"

MIJARA YEKEM

ROLA KURDAN DI DÎROKA ŞARISTANÎYETE DE

Ger çiqas car caran di nav gotarek yan rûpelek de ev behsa han di nav çend perçe rêzek kêm de bê dîtin, lê ez dikarim bejim(*) kesek heta niha di warê şaristanîyetê de behsa dîroka Kurdan nekirîye.

Netawê Kurd, her di kevin de nişteclyê şûnewareke gelek girîng bûye. Bêguman Kurdistan wek piştmazî wisa ye ji bo Rojhilata Navîn.

Her ji ber vê yeke, ji bo van samanen (serwetên) bê ser û bin, hemû dewleten emperyalist çavên xwe kirinê û dixwezin bikin bingehên xwe.

Qet guman di wê de nîne ku Kurdistan di kevin de jî her wiha girîng bûye, ji ber ku wî wextî jî ketibû nîverasta şaristanîyeten kevin ku piranîya wan li Rojhilata Nêzîk peyda bûn û ber bi firehbûnê de çûn, li ser hemûyan re jî şaristanîyetê Faris û ya Ereban ya Islamîyetê ku di lraqê de, (' Sala 1959'an, yanî we sala min Unîversîta Bexda xelas kir, ev gotara han di hejmara 5 û 6'e kovara "Balese" de hat belav kirin. Di vir de cîyen pewîst nebe destkarîyek kem li naverok û awaye nivîsandi-na we nehatîye kirin.

dema hukmê Ebbasîyan de, gihîşt bilindtirîn dereca peşkevtine. Ger wiha be, em dikarin bejin rolek netewa Kurd di van şaristanîyetan de hebûye, yanî tesîrek wî li ser çebûye, her wek çawan ewan jî tesîre li ser ya Kurdan kirine. Eva han bi tevayî ji bo me ronî dibe eðer mimkun be em bizanîn, şaris¬ tanîyetê kevin û a nû di nav hev de helîna bîr û bawerî û berhemên gelek netewên cûda pêk hatîye, ji ber ku wek aşkera bûye têkelbûna bîr û bawerî û berhemen çend netewan, dibe sebebê peydabûna şaristanîyetê û encama têkelbûn û firehbûna

sinore bîrkirinê. Bêguman ev tekelbûnen han jî bi awakî gelemperî di navbera wan netewên ku nêzîkê hev in, dibin.
Ew qismê ji netewa Kurd ên li ser sinore Faris û Ereban jîyane, di dema şaristanîyetê herdu netewan de, her çawan bibe, kêm an zade, tesîrê li ser wan herdu şaristanîyetan kirîye. Le belê, ewa ku bala mirov dikişine eva han e, gelek kes ne şareza ne li ser rola Kurdan, hinek jî dizanin, lê xwe bi zanetî jê dûr dikin.
Ji vê jî xirabtir eva han e ku hinek dîroknivîsên şoven ên kilasîk, sebebe paşvemayîn û bêhêzbûna şaristanîyetê erebî, di¬kin ser milên hinek netewen din ên bihêz en civaka Islama.
Bi kurtî şarezatîya gelek kesan bi awakî tevayî li ser rola Kurdan a dîroka şaristanîyetê nîne, bi taybetî ew xizmeta bi qîmet a wî netewî ku ji bo şaristanîyetê Islama û zanyarîya erebî pêşkêş kirîye. Ji bo zanîna vê yekê pêwistî bi lêkolîneke dûr-dirêj û gelek berfireh a derexistina holê ya rola Kurdan li ser gelek milên şaristanîyetê Faris û Ereb jî nîne, bi taybetî di hêla bîr û bawerî, civakî, zanyarî û heta sîyasetê de jî ku wek îro ji me re ronî dibe.

ROLA KURDAN LI SER ŞARISTANÎYETÊ FARISAN

Netewê Kurd bi sebebê cîrantîyê ve, her wiha paşvemayînên dîrokî yên kevin nîşan didin , beşdarê damezirandin, pêgihandin û pêşxistina şaristanîyetê Farisan bûye. Lê belê, her çend hinek vê yeka han qebul nakin jî, em dikarin eva han bi riyek û bi şeweyek din îspat bikin ku Kurdan tesîrek li ser vê şaristanîyetê kirine. Veca em ê sera rîya diduyan bigrin û hidema hinek
li ser bimeşin heta encama ku em dixwazin jê bigrin.

Gelek dîroknivîsên bi nav û deng ve yeka han qebul kirine ku serokanîya netewa Kurd diçe digihîje Medan. Li ser vê de jî gelek belgên dîrokî yên wisa hene ku bi tevayî nîşan didin , Medî, bapîrên (kalen) mezin en netewê Kurd ê îro ne.
Medî jî bi kêmasî sêsed sal berê Farisan hatine Irana û dewlet û şaristanîyetê xwe durust kirine û peyvendîya wan bi şaristanîyetê pêşkevtî ya lraqê re, bi taybetî bi ya Misrê re hebûye û li gel Kildanîyan (Keldanîyan) gelek rêk û pêk bûne, heta derecek wisa, ji bo holê rakirina Imperatorîya Asurîyan alîkarîya hevûdu kirine.
Bi vî awayî Medîyan gelek feyde ji we şaristanîyetê kevin wergirtin û qet guman di wê de nîne her piştê we, Farisan êrîş birin ser wan û wan jî her ji bo rizgarbûna bindestîya ji destê kevnebindestên xwe, xwe dan ber bi çîyayê Zagrosê û şaristanîyetê xwe di welatê xwe ye kevnare de bi cî hiştin.
Yanî bê ku mirov bi ser de zade bike, em dikarin bêjin; kakilê şaristanîyetê Farisan ya pêşkevtî ji wê şaristanîyetê bapîrên kevin ên Kurdan ku damezirandin û bi cî de hiştin, pêkhatîye.
Ji derveyê vê em dikarin bêjin, rol û tesîra Kurdan li ser şaristanîyetê Farisan di vî radeyî de nesekinî, ji ber ku bê rawestandin û serîtewandin, bi Farisan cîranên xwe re di nav hewildana guherîn û peşxistina vê şaristanîyetê de bûn.
Hêvîyek me ya gelek zade ji wê heye ku lêkolînên di van waran de yên arkeolojik van xalên han ji bo dîwarojan ronî bike û navê wan zanayên Kurd en ku xizmeta şaristanîyetê Farisan kirine ji me re aşkera bike, da ku em wan zanayên Kurd ên Musilman dinasin û dizanin kî ne, e wan jî binasin.
Bi vî awayî derdikeve ku netewê Kurd tesîrekê kirîye li ser

şaristanîyetê Farisan. Lê ger em van hemûyan jî deynin milek, di milek din de em dikarin tesîr û rola Kurdan a li ser vê şaristanîyetê derexin holê. Zanayên dîroka dibêjin; şaristanî¬yetê kevin a lraqe karekî gelek mezin kirîye ser şaristanîyetê Farisan. Li vir de pirsek girîng tê pêşîya me; li ku û kîjan riya de şaristanîyetê lraqê li ser şaristanîyetê Farisan tesîr kiriye?. Tenê yek bersîv heye ji bo vê pirsa han, ew jî eva han e ku ev kare han di riya Kurdistane ve gihîştîye welatê Farisan. Ji ber ku dema em li nexşê(xerîte) binerin, em dibinin; Kurdistan û zincîrên çîyayên wî ne ku Iran û Iraqê ji hev cîhê dike. Ji derveye vê qet ne mimkun e Kurdan wek muhafizen ser sinoren xwe, xwe ji şaristanîyetê Farisan parastibe, ji ber ku bi gelemperî wiha ye; tiştên nû daye û her weko je jî wergirtîye. Ji ber ku karaktera (tebîet,siruşt) şaristanîyetê, li ser feyde bexşîn û feyde wergirtinê hatîye danîn.

Dûr nîne kes hebin wiha bizanin ku gelê Kurd gelekî paşvemayî bûye, ji ber ve di hela şaristanîyetê de bê ku tesîr kiribe li ser qet tu şaristanîyetê, bi her awayî tesîr li ser hatîye kirin. Lê belê ji bo wan em vî bersîvê didin û dibêjin ku du gelên cîran, herdu jî bi her awayî tesîrê li ser yek û du di¬kin, her çendîn yek ji wan paşvemayî din jî pêşkevtî be. Baştirîn belge ji bo vê yekê Indîanên Sor (Kizilderîlî) ên Amerîkayê ne ku li gel wan hemû paşvemayînên xwe jî, mezintirîn tesîrê kirine ser muzîk û stranên Amerîkayê. Madem wiha ye, ji me re bi aşkera derdikeve ku netewe Kurd ger çiqas pêşkevtî jî be, her çendîn wiha jî nebûye, ji ber ku damezrênerê şaristanîyetê Medîyan ew e, her tesîrê xwe ser şaristanîyetê Faris kirîye, ji ber ku, her wekî me got;

şaristanîyetek a tik û tenê ya netewek nîne, belko di nav hev de helîna bîr û bawerî û berhemên çend netewan e.

10

MIJARA DIDUYAN

BALKEŞANEK DÎROKÎ

LISERZIMANEME

Ev gotara han(*) lekolînekê dîrokî ye ser zimanê me, bersîvek e ji bo wan kesên ku dibêjin zimanê me şaxek ji zimanê Farisî ye.

Hejmarek ji dîroknivîsan wisa dizanin ku zimanê Kurdî beşek yan zaravayek ji zimanê Farisî ye.

Em gelek dûr necin, Nehru jî di nivîsa xwe ya "Le-Mehat Min Tarixu'l 'Alem", rûpela 259'an de wiha dibêje: "Kurd, bi zimanê Farisî yê kevin diaxivin".

Lê belê, rexne li wî nayê kirin, ji ber ku bi xwe di pêşgotina kitaba xwe de, ji bo hemû kil û kêmasîyan daxwaza lêborînê kirîye, ji ber ku di wextê nivîsîna kitaba xwe de li bendîxanê de bûye û bê ku bikare ji tu serokanîyek îstîfade bike ku wan kil û kêmasîyan ji mijaran derbixe û wan nivîsen xwe jî bi riya naman re ji keça xwe(**) re şandîye. Qet dûr jî nîne gotina Iranî ya di nivîsê de bi gotina Farisî hatibe wergerandin.

Şaşîtîya vê yeka han jî dikeve ser milê wan kesên ku kitêbê

(' Di hejmara sisîyan a sala yekem e kovara "Balese" hatîye belav kirin (Teşrîna Yekem 1959, rûpel; 35-42).

( ) Mebest lndra Gandî ye.

11

wergerandine ser zimanê Erebî. Ji ber ku gelek dîroknivîs goti¬na Iran di şuna Indo-Awrupî de bikartînin. Lê gelek nivîskarên

din ku qet dûr nîne ji ber hinek sebebên veşartî zimanê kurdî li ser zimanê farisî hesêb dikin û eva han jî di bingeha xwe de bîr û bawerîyek çewt têt heseb kirin. Madem ku wiha ye, em dê hinek li ser ve mijarê bi awakî dîrokî û zanyarî ya rastî bisekinin.

Lê wan jî hemû bi avakî sererast ser vê behsa han nenivîsandine, ji ber ku her wek Mamoste Emîn Zekî dibêje; em dikarin wan bikin sê beş. Beşek, tene navê wan dîroknivîs e û qet mebestek wan di nivîsên wan de tûne bûye. Beşa diduyan li gor bingeha riya ji wan re hatîye tesbît kirin, nivîsandine. Em qet dûr necin, ger yek ji wan niha bixwaze li ser Kurdan bi¬nivîse û tiştek dilê wî/wê de ber bi Tûranîyan de hebe, ew, yekser bê ku ser bifikire gelê Kurd dike Tirk jê re jî "Tirkên çîyayî" dibêje. Beşa sisîyan jî ew zanayên payebilind in ku di nivîsînên xwe de ji bo çend quruş pere û zêran riya rastî ya zanistîyê bernedane. Tene evên han in ku bi başî navên wan tên bibîranîn û di rûpelên dîroka de cîyên xwe girtine.

Vêca ji bo ku ev deste zanayên han riya rastîyê girtine, nivîsên wan bi feyde ne, lê ew ên ku Kurdan li ser regeza Tirk û Farisan dihesibînin yan jî dibêjin zimanê wan zimanekî serbixwe nîne, ji ber ku bi zaravê zimanê cîranên xwe diaxivin, evên han tev ji desta yekem yan yê diduyan in ku ji bo firotinê ji ber xwe ve van bîr û bawerîyan durust kirine. Lê behrek zelal û xweşik bi pîsîtîya çûkek qirêj nabe.

Ji xwe eva han jî gelek aşkera ye ku ji gelê Kurd hejar û bêkestir nîne heta ku em bikarin bejin zanayên desta sisîyan han dabe ku di derbarê ziman û dîroka Kurdan de li gor daxwaza gelê Kurd binivîsin. Ew çax ronî dibe, tenê evên han in ku

rîyeka rast a zanyarîyê ji bo lêkolîna bingeha Kurdan û zima¬
nê wan dane ber xwe. Evên han jî van karan xwe ne ji bo xatirê
çava gelê Kurd, ji ber ku di riya zanyarîyê de dikin. Vêca bîr û
bawerîya van kesen han nebe, qîmetek bîr û bawerîya wan
herdu destan din qet nîne û kêra tiştek nayên.
Ji bo wan kesan, ger Kurd be yan ne, ev gotinên han tenê bes
e:
12
Çi kesê regeza Kurd yan zimanê wan li ser regezek yan li ser
zimanek din bihesibîne, ew ji rastîyê dûr e û ji ber sebebek
veşartî van derewen han en mezin dike, dîrok tu wextî ji van
derewan razî nebûye!
Ev en ku me nivîsandin, bersîvek sivik e ji bo wan kesen ku
dibêjin zimanê Kurdî Farisî ye. Lê ka em hinek din ser vê mijara
han bisekinin û pena bibin ber bîr û bawerîya rojhilatnasên
ku riya zanistîyê bernedane.
Sîr Sidîne Şems di bin navê "Kurdistana Kevin" de bi kurtî
wiha dibêje: Qet guman tê de nîne ew Karduxîyên ku Ksenefon
(Xenephon) behs dike her gelê Kurd bi xwe bûne. Veca ka em
bizanin Ksenefon kî bûye û di derbarê gelê Kurd de çi gotîye.
Biraya biçûk ê Artakserksesê paşaya Farisan Kyros (Kîros),
serokatîya kar û baran Asya Biçûk dikir. Dor û berê sala 404'e
berê zayînî, Kyros dixwest cîyê biraya xwe bigre û bibe paşaya
Farisan. Ji ber vê yekê ordîyek mezin pêkanî û ve armanca xwe
bi cî kir. Ji derveyê vê ordîya han a mezin ordîyek din jî ji bo
alîkarîya vê ordîya yekem ji Grekîyan (Oriman) pêkanî. Ev
ordîya han a ji Grekîyan pêkhatî di dîroka de bi navê "Ordî¬
ya Dehhezaran" têt naskirin.

Piştî kuştina Kyros li lraqê, Ksenefon ku yek ji wan serbaze Grekîyan bû, kar û bara ordîya xist destê xwe, bû serokê ordîye û bi ordîya xwe ve ber bi welatê xwe Yunanîstanê ve meşîya. Ewî behsa meşîna vê ordîya û hemû serpêhatîyên xwe bi awakî dîrokî eynî wextî di kitêbek de nivîsandîye(***) ku behsa Kurdan jî tê de kirîye. Ksenefon wiha dibêje: Wextê ordîya me gihîşt navça Zaxoyê em rasta gelekî aza û şerker hatin, navê wan Kartuxî bû... Ev gelê han di navçekê çîyayî de dijîya û daxwazek wan a cîhêbûnê ji Şah hebû û ji jiyana serxwebûnî û azadîyê hezdikirin.

Her wiha di vir de jî bi awakî aşkera derdikeve ku tînîtîya wî gelî ji serbestîyê û daxwaza wan ji azadî û cîhêbûnîyê ji ber wê bûye ku zimanê wan zimanek serbixwe bûye, ne wek zarava an zimanek bîyanî.

Vêca em vegerin ser behsa Sîr Sidînê Şems ku di cîyek din e

') Mebest kiteba bi nav û deng "Anabasîs" a Xenephon e.

13

gotara xwe de wiha dibêje:

Di van dawîyan de bîr û bawerîya wan zanayên ku li ser zimanê Kurd lekolîn dikin bi tevayî hat guhertin, ew di vî warî de wiha dibêjin: Zimanê kurdî, ne ji farisî û ne jî ji zima¬ nek din nehatîye wergirtin, ji ber ku zimanek taybetî û serbixwe ye û her di kevin de bi sera xwe tê de guhertin çêbûne.

Sidînê Şems, dawîya gotara xwe bi vî awayî diqedîne: "Ew kesen ku dibêjin zimanê kurdî zaravayek farisî ye, dîrok û zanistî di eksê bîr û bawerîya wan de ye".

Lê Mamoste Sayis û hejmarek ji rojhilatnasan wiha dibêjin: Zimanê Medîyan yan ev kurdîya îro bûye yan jî hîmê vî zimanî.

Ev yeka han bi tevayî kevnîtîya zimanê kurdî derdixe, ji ber ku Medî ji Farisan kevintir in û di pêşîya wan de hatine welatê Farisan û dewleta xwe danîne. Di sedsala 7an a berê zayînî, mezintirîn dewlet durust kirin û berfireh bûn, wisa le hat ku di sala 612'ê berê zayînî de navê Dewleta Asurîyan ji holê rakirin ku a nîvê cîhanê di bin destê wê dewleta girîng debû.

Wan deman Faris di bin destê Medîyan de bûn û wisa man heta dor û berê sala 550'an a berê zayînî, piştê vê Kyrosê Me¬zin derket hole û kari Farisan bin destê Medîyan derîne û dewletek ji wan re pek bîne.

Li vir pirsek têt pêş, ew jî eva han e: Gelo rê lê diçe, gelek serdest bi zimanê gelê bindestê xwe biaxive?û.

Gelek ku ewqas kevin be û 270 sal berê gelê Faris hatibe wê navçê û dor û berê sed salan berê wan, dewleta wî ya serbixwe hebe û heta Faris jî di bin destê wî de be, êdî çawan rê lê diçe bê gotin ku wan bi zimanê farisî axivtineû Eva han dimîne wî ku mirov bêje; gelê Tirk di Tirkîyê de zimanê kurdî... diaxiveû.

Belê em bêjin Medî ku serokanîya gelê Kurd in û bi zimanê farisî diaxivtin, ger wiha be, Faris û Medî herdu yek gel bûne, ji ber ku zimanê wan yek bûye.

Ger wiha be ev herdu pirsên han dertên pêşîya me û me derew dertêxin:

Yekem: Ger ev herdu gelên han yek bin û ferqek di navbera

zimanê wan de tûnebe, gelo çawan Medîyan demek dûr û direj Farisan kirin bin deste xwe?

Duyem: Ji ber çi Farisan hewlê cûdabûnê ji di Dewleta

Medîyan dan, ji bo ku dewletek nû ya serbixwe damezrînin? Ji derveyê vê bersîvê pê ve qet tu bersîvek vê pirsê nîne ku be şik zimanê wan ji zimanê Medîyan cîhê bû û gel jî bi ziman ji yek û du tên cûda kirin.

Her wek ji me re aşkera bû gelê Kurd ji gelê Faris gelek kevintir e û her wiha zimanê wan jî. Vêca ger em nebêjin farisî ji kurdî hatîye wergirtin, ew çax çi rû li xwedîyê van kesen bîr û bawerîyen xwefiroş heye bêjin, kurdî ji farisî hatîye wergir¬ tin. Wisa dixuye wan heta îro gotina şermezarîyê seh nekirine, ji ber vê li ba wan derew qet tiştek nîne, wek derewek wiha mezin ku zimanê kurdî bi wî kevnaretîya xwe ve bikin zaravayek farisî. Bi rastî tiştek wisa ne her tenê kena mirov pê têt, li wî diçe ku mirov bêje ev mirovê han kura kura xwe ye û yan ev jina han a heştê salî, keça wê jina bîst salî ye!.

Vêca li ser bîr û bawerîya rojhilatnas Majör Soane (Bînbaşî Soane) ku di kurtebehsa xwe de wiha dibêje: Di sala 401'ê berê zayînî, wî wextî ku Ksenefon gihîşt nav gelê Karduxiyan Kurdistan bingehek gelek kevin û xwedî zimanekî xwe yê tay¬ betî bû. Vî gelî han, xwe û zimanê xwe ji hemû têkelbûnê parastîye û her wek dema em zimanê Kurdî bi zimanekî din re muqayese dikin, em dibînin Kurdan zimanê xwe ji yê hemû ge¬ len din hîn zêdetir parastîye, bi derecek wisa ku ferqîtîya di navbera îro û ye sed sal berê niha ewqas mezin nîne.

Belê wek Soane dibêje; gelê Kurd di her wext di şuura zima¬ nê xwe de bûye û parastîye. Bêguman, ewên ku alîkarîyê daye ber vê parastinê tebîet (siruşt) e, ji ber ku Kurd cîyekî çîyayî yê asê de jîyane. Ji ber vê yekê ew gelên cîranên wan nikarîne bi hêsanî peywendî li gel wan deynin û tesîr ser zimanê wan

bikin, bi taybetî peywendîyên aborî, bazirganî û sîyasî ku mezintirîn sebebên têkelbûnên ziman in. Nebûna peyvendîyan wisa mezintirîn mertal e ku zimanê kurdî pa-rastîye. Tene çend gotinên erebî di netîca belavbûna Islamîye-tê ya di sala 18'ê koçî di Kurdistanê de ku têkelê nav Kurdî bûye, zimanê kurdî her paqij maye. Ev tesîrê han tenê li ser kurdî çênebûye,
15
heta niha jî dema em li zimanê tirkî û farisî dinêrin, ji nîvê wan zêdetir ji gotinên erebî pekhatine.

Niha jî gele Kurd hest bi ve yeka han kirîye, ji bo vê yekê hemû cure gotinên bîyanî yên di zimanê me de hene, ber bi windabûnê de diçin. Muqayesek biçûk di navbera wan şi'rên bi got¬inên kevin û yên nû de, yan nivîsên kevin û yên nû de, bi rastî vê yeka han ji me re ronî dikin, keft û lefta pîroz a paqijkirina zimanê me ji gotinên bîyanî zû ve destpê kirîye, niha jî dike ku bigihîje armanca xwe.

Ger wiha be sebebê nêzîkbûna zimanê kurdî û farisî çî ye?.

Qet guman di wê de nîne ku nêzîkbûnek gelek zade di navbera zimanê kurdî û yê farisî de heye, lê ev yeka han nayê wê manê ku kurdî zaravayek farisî ye. Hewce ye çend sebebek ji vê nêzîkbûna re hebe, vêca ka em hinek li ser bisekinin û bizanin ev sebebên han çi ne.

Çi kesê ku piçek zanyarîyê wî ser dîroka kevin a Kurdan û coxrafya Kurdistanê ya kevin hebe, dikare bi me re be û bêje; du sebebên vê nêzîkatîyê hene:

Yekem: Herdu ziman kurdî û farisî, beşekê ji yek familya zi¬man in, eva han jî familya zimanê Indo-Awrupî ye.

Ji ber vê yekê em dibinin ku ne tenê di navbera zimanê kurdî

û farisî de, lê di navbera kurdî û zimanên din ên di vê famîlye de nin jî nêzîkbûnek gelek zade heye. Gelek gotin henin di frensizi û kurdî de, yan kurdî û îtalî de tên eynî manê. Wek "birî", "çav" û "ejno" (çok) yê kurdî û frensizi yan "biro", "kî" û "karwan"î kurdî û îtalî.

Ji derveyê van gelek kelîmên din jî di nav kurdî-îtalî û kurdî-frensizî, ingilîzî û gelek zimanên din de ku ji familya zimanê Indo-Awrupî ne, henin, wek hev in û mana wan jî wek hev e... Lê ma gelo ev nêzîkbûyîna han têt wê manê ku kurdî zaravayek frensizi yan îtalî ye?.. Ku wiha be, nêzîkbûyîna farisî û kurdî jî tiştek din e, yanî sebeb ew e ku herdu ji yek familya ziman in.

Duyem: Aşkera ye ku nêzîkbûna di navbera zimanê kurdî û farisî, ji zimanê din ên ji familya Indo-Awrupî zêdetir e. Sebe¬bê vê jî, nêzîkbûna Kurdistan û Irana ye, ev nêzîkbûna han bûye sebebê têkelbûna çend gotinên wan di nav zimanê me de û

yê me jî di nav zimanê wan de. Li ser van tevan de, herdu gel jî Musilman in, eva han jî bi hindikî bûye sebebê wekhevbûna piranîya wan gotinên ku peywendîya wan bi dîn (ol) ve heye.

Ji derveyê van, ev herdu sebebên han dikarin bi kemasî sebebek dîrokî ye din jî peyda bikin, ji ber ku eðer yek lekolînê li ser dîroka Medîyan û awaye fewtandina dewleta wan bike, dikare ji me re sebebê nêzîkbûyîna Kurd û Farisan bi vî awayî ronî bike:

Dor-berê sala 550'ye berê zayînî, Dewleta Medî, piste şerek mezin di navbera şaha Medîyan Istyaczo û Şaha Farisan Kyrosê Mezin de qewimî. Bi vî awayî Farisan ku berê di bin destê

Medîyan de bûn, wisa lê hat Medî ketin bin destê wan, ewan jî ku serxwebûyîna xwe winda kirin, beşek zade ji wan ber bi çîyayên Kurdistanê ve çûn û li wir têkelê nav gelên din ên wan navçan bûn û gelê Kurd pêkanîn. Vêca qet tu guman di wê de nîne ku têkilîyek di navbera wan û Medî û Farisan de peyda bûye, ji ber ku Faris demek di bin destê Medîyan de û Medî jî di bin destê wan de bûne. Bêguman ev têkîlîya han tesîrê li ser herdu zimanên û bi kemasî nêzîkatîyek di navbera wan de peyda kirîye.

Hejmarek ji dîroknivîsan di derheqê vê nêzîkbûyîna de dibê¬jin ku gelek hebûye navê wî Parsî bûye û ji gelê Indo-Awrupî bûye û beşek ji wî gelî têkelê nav Farisan û beşek din jî têkelê nav Kurdan bûye û di nav wan de helîyaye, eva han jî bûye sebebê wê ku çend gotin ji zimanê wan têkelê nav kurdîyê û çend jî nav farisîyê be. Niha jî ev gotinên han bûne sebebê peydabûna nêzîkatîya kurdî û farisîyê.

Piştî bi kurtî muqayesekirin û lekolînê ser zimanê kurdî û farisî, carek din em vê pirsa han nû dikin:

Gelo çi rû li hinek kesên bîr û bawerfiroş heye ku bêjin kurdî zimanek, yan zaravekê farisî yan bîyanî ye??!!

Dîsa cara duyem em ê birsîva wan bidin û bêjin: Behreke zelal û xweşik bi pîsîtîya çûkek qirêj nabe!

17

Çend îzahet :

1) Aşkera ye serokanîyên serekî yên van herdu gotaran min, berhemên Mamoste Emîn Zekî û Taha Baqir bûn.

2) Gotara yekem temam nebûye. Çûna min a ji derve ya sala 1960'an de ji bo xwendinê, bû sebebê nenivîsîna beşên din.

3) Min "zarav" di cîyê lehçê de bikaranîye.
4) Hest û turrebûn bi herdukan ve dîyar in.
18
MIJARA SISIYAN
ŞEREFNAME DI KURDNASÎYA
SOVYETE DE
Xwendevarek Kurd yan rojhilatnasek tûne ku navê Şeref¬
namê û Şerefxane Bediîsi sehnekiribe. Heta niha bi gelek zi¬
man û dehan car kurt an dirêj di derbarê Şerefnamê de hatîye
nivîsandin(*). Bi gelemperî rojhilatnasên Sovyet û bi taybetî
Kurdnasên Sovyet, qîmetek dîyar û giranbahayekî mezin bi
herdu cildên Şerefnamê û nivîskarê wê dane. Hejmarek gelek
zade ji rojhilatnasên Sovyetê, çi ji bo nivîsandinên xwe yên ser
lêkolîna dîroka Kurdistanê û çi jî yên ser lekolînê herêmên din
ên Rojhilata Navîn, gelek ji Şerefnamê îstîfade kirine. Di
salan 30'an de, ji rojhilatnas û Kurdnas F.P.Rastopiçin(l) hat
(' Di sala 1973'an de, li gel peşgotinek çapa Kurdî ya Şerefnamê
hatîya belav kirin.
W Rojhilatnase Sovyet F.P.Rastopiçîn, di salen 30'an de çend berhemekî
bi qîmet di derbare gele Kurd de belav kirîye. Rastopiçîn, di
cîhane de yekem zana ye ku yekem bibliyografya li ser Kurdan
nivîsandîye û di wexte xwe de bin nave "Bibliyografya Derbare Me¬
sela Kurd" di kovara Rojhilata Şoreşger de belav kirîye. (Binere:
Rojhilata Şoreşger, bi zimane Rusî, hejmar: 3-4, sal: 1933, rûpel: 292-
326 û hejmara eyne sale, rûpel: 159-173). Yek ji gotaren bi qîmet en
19
daxwaz kirin ku Şerefnamê wergerîne Rusî lê belê gelek mixabin,
mirina bêwext musa'eda cîbicîkirina vî kara zanistî yê

pêwîst neda.
Qîmetdana rojhilatnasên Sovyet bi Şerefnamê di dawîya 50'an de, gihîşt bilindtirîn derece. Di vî navî re Beşa Kurdî Leqa Lenîngrade ya Unîversîta rojhilatnasî ya Akademîya Zanyarî ya Sovyet, wergerana Şerefnamê ji zimanê Farisî bi ser zimanê Rusî siparte Yefgina Vasîlîva. Cîbicîkirina vî karî pêwistîya çend salek bêrawestandin dixwest. Di sala 1967'an de, cûda yekem a Şerefnamê hat çapkirin(2) . Çend meh piştê vê, fermanberê zanistî yê Unîversîta Gelên Rojhila¬ta Nêzîk û Navîn a ser Akademîya Zanyarî ya Azerbeycana Sovyetê, Memet Şemsî, ew xebata bi navê Şerefnamê Şerefxanê Bedlîsî Wek Serokanîya Dîroka Gelê Kurd(3) ku ji bo lêkolîna Şerefnamê amade kiribû û berhemê karekî bêwestan ê çend salan bû, nama doktoraya pê sitend.
Rastopiçîn "Serene Derbare Kurd" e, di hejmara 13-14 ya sala 1932' an de, di kovara "Dengûbehsen Rojhilata Navîn" de belav kirîye (Binere: Kovara nave we derbaz bû, rûpel; 72-93).
Rastopiçîn, ve berheme ji bo lekolînê birek milen girîng en jîyana aborî û civakî ya Kurdan amade kirîye. Di destpeka ve gotare de Rastopiçîn erîşeke gelek tund û tuj kirîye ser wan dîroknivîsen kurtbîn en ku xebata gele Kurd lekedarî kirine. Di eynî wextî de Ras¬topiçîn, bi awakî tundî rexne li wan nivîsaren Sovyete jî kirîye ku bi nezanî, wek dibeje; "di bin perdeyek teng a Marksîzme de" tuhmeta kevneperestîye dane ser hemû tevðeren rizgarîxwazî yen Kurd.
(2) Li gel temambûna wergerandina cilda yekem a Şerefnamê, Vasîlîva, dest avet wergerandina cilda diduyan jî, ku di sala 1976'an de, ewe jî bi Rusî çap kir. Ji ber ku ev peşgotina han bere weşandina cilda diduyan a Şerefnamê hatîye nivîsandin, te de behsa cilda di¬

duyan nehatîye kirin. Di derbare cilda diduyan a "Şerefname" de, binere: Dr.Kemal Mezher, Mejû, Kurte Basekî Zanistî Mejû, Bexdad 1983, rûpel; 110-126.

'3' Ve nama han bi zimane Azerî nivîsandîye, kurtîya we bi Rusî çapkirîye. di wextek şûn de name bi xwe jî di ketebeke serbixwe de li Bako çapkirîye.

20

Ev herdu şarezayên han bi awakî zanistî ketin nav kurayîya qîmeta Şerefnamê û gelek milên wê yên ku nedihatin zanîn û jîyana Şerefxanê Bedlîsî yekem car bi awakî rêk û pêk xistin ber destan rojhilatnasên xwe û yên derve. Bêguman, bi kurtî be jî behsa wan di pêşgotina çapa yekem a Kurdî ya Şerefnamê de, karek di ciyê xwe de ye û pêwîst e.

Cilda yekem a Şerefnamê ya bi Rusî 619 rûpel e(4) , tenê 412 rûpelên wê ji nivîsandina Şerefxan bi xwe pêkhatîye. Yên din ji pêşgotin, paşgotin û kurtebehsek bi ingilîzî ku ser kitêbê hatîye nivîsandin, pêkhatîye, evên han tev ji alîyê berêz zanayê Sovyetî Y.Vasîlîva ve hatîne amade kirin.

Y.Vasîlîva, di 55 rûpelên pêşgotina de ser giringîya Şeref¬namê sekinîye û qîmeta wê ya bilind a zanistî daye dîyar ki¬rin û gelek bi zanyarîyên nû yên di vî warî de belav kirîye ku piranîya wan ji alîyên xwendevarên Kurd de nedihatin zanîn.

Di vê pêşgotina de zanayê Sovyet, bi dirêjî behsa dîroka lêkolîna Şerefnamê û destnivîsên wê yên kevin û ew kitêbxanên ku ev destnivîsên han tê de nin û gelek behsên din ên wek van babetan kirîye.

Wek Vasîlîva nivîsandîye, Hêrbîlo, di sala 1776'an de, di rûpelên 836, 841 'ê wê kitaba xwe ya bi navê Kitêbxanên Rojhilat

Yan Ferhenga Giştî ya bi zimanê frensî belav kirîye, ye¬
kem car behsa Şerefnamê gîhandîye cîhana zanyarî ya îro(5)
. Agahdarîya Hêrbîlo yê ku navê wî derbaz bû ser Şerefnamê,
di rîya nivîsên gerokekî Tirk ê bi nav û deng ê sedsala 17'an,
Katib Çelebî ve çêbûye(6) . Piştê wî, J.Malcolm(7) yekem
(4) 1300 lib ji cilda yekem a Şerefname bi Rusî bi awakî qîmet
hatîye çapkirin û gelek bi zû hemû hatine firotin û niha bûye berhemek
antîke.
^5' Li gor wan zanyarîyen ku di Bibliyografya J.S.Musaelyan de
hatine belav kirin, Herbîlo, di penc ciyen kiteba xwe de behsa Kur¬
dan û Şerefname kirîye ku ew di rûpelên; 317, 706, 807,836 û 841'an de
nin. (Binere: J.S.Musaelyan, Bibliyografya Kurdnasîye, bi zimane
Rusî, Moskova 1963, rûpel; 55).
'" Binere; rûpela 14'an a pêşgotina Y.Vasîlîva.
(') J.Malcolm (1769-1833), yek ji karbidesten naskirî ye Britanya
21
Awrupî ye ku detsnivîsên Şerefnamê bi dest xistîye. Malcolm,
di warê zanistîyê de jî feyde ji Şerefnamê wergirtîye.
Ewî di cilda diduyan a kitaba xwe ya bi nav û deng de ku di
derbarê dîroka Irana de ye(8) , be ku navê kitêbê û nivîskarê
wê bîne, çend caran zanyarîyên xwe ji Şerefnamê girtîye.
Bêguman, di wî çaxî de bikaranîna Şerefnamê wek serokanî
ji alîyê şarezayek wek Malcolm ve, belgeyek dîrokî ye ji bo
bihayê bilind û qîmeta mezin a Şerefnamê .
Bîst sal piştê J. Malcolm, dîroknivîse Frensî Etienne Marc
Quatremere, di gelek cîyên wê kitaba xwe ya di sala 1836'an
li Parîsê bi navê Dîroka Moxolîyên Irana weşandîye, feyde ji
"Şerefnamê" Şerefxanê Bediîsi wergirtîye.

Y.Vasîlîva, bi dirêjahî behsa cîyê Şerefnamê di nav rojhilatnasîya Rusî de kirîye. X.D.Frên, yekemin zanayê Rus e ku di sala 1826'an, di rojnamekê Peterborga paytext de behsa Şerefnamê wek "serokanîyek dîrokî ya heri girîng" kirîye (9).

Sê sal şûn de cardin Frên di nivîsek xwe de behsa Şerefnamê kirîye, daxwaz kirîye ku bi zûtirîn wext Farisîyê wê bê belav kirin û bê wergerandin ser zimanek Awrupî.

Bi qasek şûn de zana û karbidestê Akademîya Zanyarî ya bû, demek direj li Hindistan û Irane kar kir, şarezatîyekî wî ya gelek zede di derbare welat û gelen Rojhilate de hebû, gelek nivîsen bi qîmet en di van waran de li pe xwe hîşt. Li Irane, hejmarek gelek zede serokanî û destnivîsên kevin bi deste Malcolm ketîne, Şerefnamê Şerefxane Bediîsi jî yek ji wan bûye.

(°) J.Malcolm, The history of Persia from the most early period to the present time, Vol.II, London, 1815, pp. 207-208.

(*' Mamoste K.Kurdo, di gotareke de wiha dibêje; M.Volkov, yekem kes e, ku di sala 1826'an de, bi direjî behsa Şerefname kirîye. Li gor zanyarîyen Mamoste Kurdo, ji derveye Fren e ku nave wî derbaz bû, hejmarek din a rojhilatnasên Rusî jî di wî wextî de doza belav kirin û wergerandina "Şerefname" kirine. (Binere; K.K.Kurdoyev, Kurdnasî, kiteba "Muzexana Asya-Liqa Lenîngrade ya Unîversîta Rojhilatnase Akademîya Zanyarî ya Yekîtîya Sovyet", Moskova 1972, rûpel; 386-387).

22

Rusya, Vilyamînov Zîrnov(lO) , wezîfa belavkirina Şerefnamê bi Farisî girt ser mile xwe û karî di sala 1860'an de, cilda yekem bi pêşgotinek bîst rûpel ya bi qîmet a bi zima¬

nê Frensî ve belav bike(ll).
Du sal piştê vê, cilda diduyan jî bi pêşgotinek heft rûpel a bi zimanê frensî ya heft rûpel hat belav kirin(12). Cîbicîkirina vî karî han, ewqas dereca zanistîya Vilyamînov Zîrnov bilind kir ku ji bo Akademîya Zanyarî wek endamek çalak hat bijartin.
Vasîlîva, beşekê gelek bi feyde ya pêşgotina xwe ji bo behsa destnivîsên Şerefnamê amade kirîye, wek dibêje; hejmarên van destnivîsên gelek zade ne. Hejmarên berhevkirî yên dest¬nivîsên Şerefname , tenê yên di kitêbxanên naskirî yên cîhanê de, digihîjin 22 liban(13) . Eva han jî, bêguman, belgek din a girîngîya Şerefnamê ye ku wisa dixuyê gelek ji kevin de dîqeta zanayên kêşaye û hejmarek zade ji van kesan li ser nivîsandine(14) .
Li gor wan zanyarîyên ku Y.Vasîlîva kom kirîye; kevintirîn, bi qîmettirîn û rasttirîn destnivîsa Şerefname ya ku tet zanîn, nusxa bi desbcetê pîroz ê Şerefxan bi xwe ye ku bi navê "Şerefname Tarîxa Kurdistan" hatî nivîsandin û ku niha di Kitêbxana Bodleîan a Unîversîta Oxfordê de ye.
Ev destnivîsa han a bi gîmet a Şerefnamê , 246 rûpel e û bi
(10) Vilyamînov Zîrnov (Viladîmîr Viladîmîrevîç 1830-1914) yek ji rojhilatnasên Rusya ye naskirî ye, şarezayekî baş e ziman, arkeo¬loji û dîroke bû, gelek zimanên dizanî, di sala 1861-an de, bûye enda¬mek çalak e Akademîya Zanyarî. Beşek zede berhemen Vilyamînov Zîrnov, ji bo lekolînê ziman û dîroka gelen rojhilat en nav Rusya Çarîtîye de hatîye amade kirin. Ji ber ve yeke yek ji wan zimanên Zîrnov bi rewanî dizanî, farisî bû û di saya wî de Şerefname belav kir.

'J1' Beşa Farisî ya ve cilda han a Şerefname 459 rûpel e.
(*2' Beşa Farisî ya cilda duyeme "Şerefname", rûpel; 459.
^3) Binere; rûpela 17'an a pêşgotina Y.Vasîlîva.
^14' Dûr nîne ku niha jî hejmarek zede destnivîsên kevin en Şe¬refname li Kurdistane yan jî di ciyen din en Rojhilata Navîn de ne¬bin.
23
bîst wênên antîke ve hatîye xemilandin, di dawîya Zulhîcca sala 1005'ê koçî (hicrî) de (13'ê Tebaxa sala 1597'zayînîmîladî) Şerefxan dawîyê bi nivîsîna wê anîye. Yanî ev dest¬nivîsa han yekem nusxa nivîsandî ya Şerefnamê ye, ji ber ku Şerefxanê Bediîsi meha di Tebaxa sala 1597'an nivîsandina cilda yekem û di meha Gulana sala 1599'an de jî nivîsandina cilda diduyan xelas kirîye.
Nusxa diduyan a bi qîmet a Şerefnamê ew liba ku di Kitêbxana Giştî ya Lenîngradê de ye. Dîroka nivîsîna vê nusxa han di sala 1598 an û Şerefxan bi xwe redakte kirîye û bi destê xwe yê pîroz muhra xwe ya taybetî ser daye. Gelek mixabin, çend ciyên kêm ên vê destnivîsa nemane. Hêjayê gotina ye, ev destnivîsa han a Şerefnamê yek ji wan berhemên bi qîmet bûye di Kitebxana bi nav û deng ya Sefewîyan de ku Rusan di wextê Şerê 1826-1828'an ji Erdebîlê anîne bajarê Peterborgê. Destnivîsekê Şerefnamê ya kevin ku di sala 1606'an, li bajarê Kilîsê ji alîyê Hesenê kura Nureddîn ve li ber nusxa ye¬kem a Şerefname hatîye nivîsandin, 327 rûpel e û li Kitêbxana Bodleîan de ye.
Ji derveyê van, Y.Vasîlîva behsa çend lib destnivîsên kevin yên Şerefnamê, yên wek wan destnivîsên li Muzexana Britan¬

ya, Kitêbxana Stenbol û çend ciyên din hatine parastin, kirîye(15) .

Heta niha çend caran Şerefname ji zimanê farisî hatîye wergerandin ser çend zimanên din. Li gor gotina Vasîlîva, kevintirîn wergera Şerefnamê ew herdu wergerandinên cîhê kirî yên bi zimanê tirkî ne. Yek ji van kurtebirîya Şerefnamê ye, ya din jî temama wê ye. Heta niha du destnivîsên yekê û destnivîsek jî ya diduyan hatîye dîtin, lê yek ji van jî nehatine belav kirin. Kurtebirîya Şerefnamê ji alîyê Mihemmed Begê Ehmed Begê Mîrza ve di sala 1078'ê koçî (1667-1668'ê zayînî) hatîye wergerandin, ya din jî di salan 80'î sedsala 17an de, ji alîyê kesek ku navê wî Samî ye, hatîye wergerandin(16) .

(15) Binêre; rûpelên 17-20'an en pêşgotina Y.Vasîlîva.

"°) Rûpelên 20-21 'an en eynî serokanîye.

Dor û berê du sed sal piştî van, cilda yekem a Şerefnamê ji alîyê rewşenbîrekî herî zîrek ê sedsala 19'an a Kurdistane, Mele Mehmûdê Beyazîdî ve(17), yekem car wergerandîye kurdî. Mele Mehmud, dor û berê salan 1858-1859'an, bi handa¬na Kurdnasê bi nav û deng ê Rusî, Aleksander Jaba ve vî karî han kirîye(18) . Destivîsa vê nusxa kurdî ya Şerefname di Kitêbxana Gişti ya Lenîngradê de hatîye parastin.

Her di wan dor û beran de jî li bajarê Vîyanayê, paytextê Nemse(Avusturya), Şerefname ji alîyê G.A.Barbe ve bi Almanî hatîye wergerandin û beş bi beş di navbera salan 1853, 1859'an de, li gel pêşgotinekê werger de hatîye belav kirin.

Bi qasek şûn de karekî zanistî yê girîng di derbarê

Şerefnamê de hat kirin ku ev karî han bûye sebebê nasandina Şerefnamê ji alîyê temama akademîyen zanyarîyên Rojava ve. Vî karî han Prof.F.B.Charmoy ku di wî wextî de mezin¬tirîn Farisîzanê Awrupa dihat zanîn, karî di navbera salan 1868 û 1875'an de, li Peterborgê herdu cildên Şerefnamê bi zimanê frensî belav bike.

Ev kara han berhemê bê rawestandin a berdewamî yê 30 sa-

(17) Mele Mehmude Bayezîdî, zanayekî payebilinde Kurd e. Dor û bere dawîya sedsala 18'an ji dayîk bûye, gelek ji zimanên Rojhilata zanîye û hejmarek gelek zade berhemen bi qîmet li pe xwe hiştîye ku navek re diqeta Kurdnasan keşaye û qîmetek zede pe dane. Werge¬randina Şerefname bi kurdî ji alîyê wî de, bi sera xwe karekî mezin e. Di derbare jîyan û berhemen Mele Mehmudê Bayezîdî de binere; Mêjû, rûpel; 126-131.

(18) Aleksander Jaba, wexte xwe de konsolosa Rusya bûye, demek di nav Kurdan de jîya ye, di nêzîk de Kurdan naskirîye û gelek berhe¬men bi qîmet di derbarê wan de nivîsandîye.

Yek ji berhemen Jaba "Cam'îyê Risalayan û Hikayatan Bi Zimanê Kurmancî" ye, ku ji hejmarekê gelek zede pend û çîroken folklorî yên kurdî yên berhevkirî pêkhatîye, evan tev kirîye frensî û di sala 1860'an de, li Peterborgê di kitêbekê serbixwe de çapkirîye. Jaba, havreyekî gelek nezîke Mele Mehmude Bayezîdî bûye, bi alîkarîya wî, karibûye gelek destnivîsên bi qîmet peyda bike û gelek alîyen zi¬man û jîyana rewşenbîrî ya gelê Kurd bikole, ku ciyên wan di kitebxana Kurdnasîye de dîyar in.

25

lên Charmoy bû, Şerefname ji çapa Wilyamînov Zîrnov ve wergerandîye, lê ser vê de jî ji du destnivîsên din ên kevin jî

îstîfade kirîye.
Çapa Fransî ya Şerefname , çar cildên serbixwe ne, beşa ye¬
kem a cilda yekem di sala 1868'an, beşa diduyan a cilda ye¬
kem di sala 1870'an, beşa yekem a cilda diduyan di sala
1875'an de hatine çapkirin(19). Charmoy, rîayetê hemû
prensîbên mercê zariyarîyên wergeranê kirîye. Bîr û ray û wan
rastî û ronîkirinên xwe yên pêwistî zanîye, di perawêzên kita¬
ba de belav kirîye. Her wiha pêşgotinek jê re nivîsandîye ku
tê de behsa Şeref-namê, hinek milên jîyana Kurdewarî û coxrafya
Kurdistanê kirîye.
Vasîlîva, çend rexnen di cîyê xwe de li pêşgotina F.B.-
Charmoy girtîye, lê li gel vê jî, vê yeka han qebul kirîye ku
ev wergerandina han "heta îro jî ji qîmeta xwe ya zanistîyê
tiştek winda nekirîye"(20) .
Piştê van zanyarîyên bi qîmet yên di derbarê wan de kêm
hatine zanîn, Y.Vasîlîva dikeve behsa pesn û girîngîya
Şerefnamê , bîr û bawerîya xwe di vî warî de dixe holê û bi vî
awayî didomîne:
Cjîmeta zanyarîyê vê serokanîyê ewqas zade ye, pêwistî û
îhtîyaca wê bi methê nîne, qet nebe ji ber wê ku bi alîkarîya
Şerefnamê mirov dikare ciyê girîng ê windabûyî yê gelê Kurd
di dîroka Rojhilata Navîn de dîyar bike(21), bêguman qîmeta
vê yeka han jî nayê pîvan, ji ber ku gelê Kurd, her wekî rojhilatnasê
herî bi nav û deng ê Rusya û Sovyete Orbelî(22) di¬
bêje; "tesîrekê bi yekcarî mezin kirîye ser jîyana rewşenbîrên
"*' Binere; rûpelên 21 û 49'e pêşgotina V.Vasîlîva.
(20) RUpeia 23'an a eynê serokanîyê.
(21) Rûpela 37'an a eynî serokanîyê.

(22) Arkeolog û dîroknivîse Sovyetî ye bi nav û deng Isuv Abgarovîç Orbelî (1887-1961), yek ji wan zanayên paye bilind e ku bi kurayî û berfirehî ziman û dîroka gele Kurd û rewşa jiyana siyasî û civakî ya wan têgihîştîye, bi çavekî rez li wan nerîye û xizmeteke zede ji Kurdnasîye re kirîye. Destekî wî ye bilind tegihandina hejmarek ji zanayên Kûrden Sovyete de heye. Hejaye gotine ye, Isuv Abgarovîç Orbelî, Ermenî ye.

26

Rojhilat. Kurdan, gelek hebûnên xwe di bin navê Faris, Tirk, Ereb û Ermenîyan de(23) ji deste xwe kirîye, wek eva han ku kesên ji wan ên şair, hunermend û cengawerên nemir dîroka çend gelan xemilandine. Vê yeka han jî tesîrekê wisa kirîye ser zanayên Awrupa û Rusya ku di nav wan de bibe adet û be¬lav be; gûya Kurd, ne tenê nikare tiştek di warê rewşenbîrîyê de bîne holê belko xwedan hezek wisa jî nîne heta bikare tişteke ji biyanîyan jî hîn be". Lêbelê, wek Vasîlîva dibêje; bi alîka-rîya Şerefnamê mirov dikare vê valatîya mezin a dîroka gelên Rojhilat tejî bike û ciye rasteqînî yê netewa Kurd tê de bide dîyar kirin.

Yek ji wan encamen girîng ên ku zanayê Sovyet Y.Vasîlîva di derbarê naveroka Şerefnamê de daye fam kirin eva han e ku kurdnas bi alîkarîya ve serokanîyê dîrokî ya esîl, dikarin bi awakî berfireh gelek rûyên jiyana sîyasî û civakî ya îro ya Kurdan tê bigehin, reh û rîşên xebata rewa ya vî gelî "ya di riya rizgarîya ji bindestîya netewî û ji bo wekhevîya wî li gel gelên din" dîyar bike(24) .

Ev tesbîtên Vasîlîva gelek rast û durust in, ji ber ku "Şeref¬namê" Şerefxanê Bedlîsî, gelek milên girîng ên xebata asê ya

netewa Kurd ên sedsalên borî de weşandîye ku ji alîyê dîroknivîsên me û yên bîyanîyan de nedihatin zanîn. ji ber ku heta îro jî bi tevayî nehatine zanîn, eva han jî bûye sebebek mezin e tênegîhiştina tevgera rizgarîxwazîya netewî ya gelê Kurd ji alîyê bîyanîyan de.

Vasîlîva, ji 120 rûpelên zêdetir ji dawîya kiteba xwe ji bo tebînî, ronî kirin, muqayese û rastkirin, naven serokanîyan, melbend û kurtebehsekê jî di derbarê Şerefnamê de amade kirîye. Bêguman, evên han jî hîn zêdetir bihayê zanyarîyê kare wî bilind kirîye. Hêjayê gotina ye ku rojhilatnasên Sov¬ yet qîmetekê gelek zade dan vî karî han ê Vasîlîva û ve yeka han destkevtineke aşkera ya Kurdanasîyê hesibandin(25) .

(23) Hewce bû Azerbeycan jî bexe li ser.

(24) Binere; rûpela 67'an a pêşgotina Y.Vasîlîva.

27

Zanayê Azerî Memed (Mihemmed) Şemsî, ji derveyê nama xwe ya doktoraya, zencîrek gotaran zanistî di derbarê Şerefxanê Bedlîsî û Şerefnamê de belav kir, wek "Dîroknivîsê Bi Nav û Deng ê Kurd Şerefxanê Bedlîsî"(26) û "Behsa Serîhildanên Sedsala Şanzdehan a Eşîrên Kurdan Di Şerefnamê de" (27).

Dr.Şemsî, di nama xwe ya doktoraya de, bi dirêjî behsa jîyan û serpêhatîyên Şerefxan û rewşa jiyana siyasî û civakî ya Kurdistanê ya sedsala 16'an dike û ser naveroka Şerefnamê disekine. Ji bo ronîkirina van behsên han hejmarekê gelek zade serokanîyên wek "Nuzhetu'l-Qulub" a Hemdulla Qezwînî û berhemên birek dîroknivîsên hevçaxê Şerefxan bikar anîye, wek berhemê Qazî Ehmedê Xefarî.

Dr.Şemsî jî wek Vasîlîva, bi dirêjî behsa qîmeta Şerefnamê kirîye û di vî warî de wiha dibêje: Dîroknivîsên piştê Şerefxan, ên wek Katib Çelebî, Ewlîya Çelebî û gelekî din, di berhemên xwe de ji hemû serokanîyên zêdetir Şerefnamê bikaranîne. Di eynî wextî de Şemsî vê şaşîtîya han jî rastkirîye ku wek grubek dîroknivîs dibêjin, gûya Şerefxan Şerefnamê bi handana Şaha Irana nivîsandîye. Di rastîya xwe de, wextê Şerefxan Şerefnamê nivîsandîye nêzîkatîya wî bi Sultanên Osmanîyan re zêdetir bûye, li gor gotina Dr.Şemsî; heta Osmanîyan alîkarîya wî jî kirine.

Li ser van tevan re jî di naveroka Şerefnamê de heta radeyek gelek zade hest bi bê alîgirîyê têt kirin. Wek mîsal, Şerefxan, mihêldarîya Şah Tehmasb û ya Sultan Murada Sayem yek cura kirîye û xwe ser şûr û tîrkêşana wan ji hev re bêdeng kirîye.

Şerefxan, bi awakî gelek aşkera wan sebebên ku wî han

(25) Binere; Kovara Gelen Asya û Afrika, bi zimanê Rusî, hejmar 6, sal 1968, rûpel; 201-202. Kovara navê wê derbaz bû, ve yeka han qebul kirîye ku kare Y.Vasîlîva, di hemû milan de destkevtinek girîng ên Rojhilatnasîya Sovyete ne.

(2°) Binêre; kovara Hevalen Akademîya Zanyarî ya Azerbeycana Sovyete, bi zimanê Rusî û Azerî, hejmar 1, sal 1967, rûpel; 67-72.

(2') Eynê kovar, hejmar 1, sal 1968, rûpel; 40-46.

28

daye ji bo nivîsandina Şerefnamê, ronî kirîye. Di destpêka kitaba xwe de wiha dibêje: Ji bo ku heta îro dîroknivîsên qet tiştek di derbarê Kurd û Kurdistanê de nenivîsandine, min xwest li gor îmkana xwe di vî warî de kitêbek binvîsim û navê

wê jî deynim Şerefname. Armanca min ji vê jî ew e ku navê xanedanên Kurdan wenda nebin!
Madem wiha ye, berê her tiştî û pêşîya hemû sebebên; gîyan û hestê Kurdayetîyê Şerefxan han daye ku Şerefnamê binvîse. Belgên ve rasteqînîya han gelek caran di nav Şerefnamê bi xwe de têt dîtin. Wek mîsal, ji serî heta binî di Şerefnamê de, bi awakî aşkera bê ku nav û unvana Sultan hilde, bin lêv re wiha dibêje:
"Kurdistan, welatek e ne ji alîye kesek de tê îşgal kirin û ne ji bo kesekî sernizmîyê dike!"
Ji derveye van hemû tiştan, Şerefxanê Bedlîsî yekem kes e bi awakî durust sînorê Kurdistanê dîyar kirîye. Berê Şerefxan, bi taybetî dema Selçukîyan de Kurdistan ji wan melbendan re dihat gotin ku ketibûn navbera Azerbaycan, Loristan û rojavayê zincîrên Çîyayê Zagrosê. Lê di Şerefnamê de, sinorên Kurdistanê ji Meletyê destpê dike û ser qeraxên Xelîcê dawî pe têt.. Evên han jî di rastîya xwe de nîşanên wan in ku her di sedsala 16'an de, destpêka durustbûna hestê netewî di nav ser¬okên Kurdan de ber bi ajardane de bûye.
Milekê girîng a din a kara zanistî yê Dr. Şemsî ya di derbarê Şerefnamê de eva han e ku bi alîkarîya naverok û ser ronahîya rêbazekî zanyarî ya durust, kariye çend milekê aloz û kêmhatîzanîn a jîyana civakî û aborî ya çend navçên Kurdis¬tanê yê dawîya qerna navîn de ronî bike. Li gor zanyarîyên di nav Şerefnamê de, bingeha jîyana aborî ya Fermanrewatîya Bedlîsê ya Çjerna Navîn, ser awakî hebûna axên biçûk hatibû damezrandin, bindestîya cotkaran jî qalibê xwe yê taybetî wergirtibû, bi wî awayî ku tenê di çarçova berhemanînê de

hatibû girtin. Cotkaran, dibû ser vê de jî parêzgerîya berjewenda siyasî ya serokên xwe bikin û di hemû şerên axayên xwe de beşdar bin. Ev şerên han beşek encama dijîtîyên serokên mîrîtîyan bi xwe bûn.

Hêjayê gotina ye, Memed Şemsî, nama doxtora xwe wek ki-

têb jî bi eynî navî belav kirîye. Ev kitaba han jî, destkevtîyek din a Kurdnasîya Sovyetê ye, kitêb, ji 144 rûpelên pêkhatîye û 1700 nusxe jê hatîye çapkirin. Dr.Şemsî, ji 134 serokanîyên cur bi cur îstîfade kirîye û navên wan di dawîya kitêbê de be¬lav kirîye.

Qanadê Kurdo jî di sala 1972'an de, di wê gotara xwe ya bi navê "Kurdnasî" weşandi, behsa Şerefnamê kirîye(28). Di ve gotara de Q.Kurdo, bi taybetî bal kêşaye ser destnivîsên kevin ên Şerefnamê(29) .

Wek Q.Kurdo dibêje; M.Volkov, yekem kes e di salan 20'ên sedsala 19'an de, di çend rûpelên de behsa destnivîsên Şerefnamê kirîye û X.D.Frên jî yekem kes e, her di wan dor û beran de di gotaran xwe de behsa qîmet û pêwistîya weşandin û wergerandina Şerefnamê kirîye(30). Piştê vê, Mamoste Qanadê Kurdo, têt ser behsa dîroka lêkolînên Şerefnamê yên ku ji alîyê rojhilatnasên Rusya û Sovyet ve hatine kirin.

Bi vî awayî ciyekê berz û hêjayê Şerefnamê di Kurdnasîya Sovyetê de heye. Wan rastîyên ku me li jorê behs kirin, heta derecek yarîderên dîyarkirina qîmeta zade ya çapan Kurdî yên Şerefnamê didin(31). Bêguman, Mamoste Hejar, bi werge¬randina Şerefname ser zimanê Kurdî, valatîyek mezin di kitêbxana kurdî de tijî kir û "Akademîya Zanyarî ya Kurd" jî bi

belavkirina wê, wezîfek girîng a ser milê xwe bicî anî.
(2°) Derbarê ve gotara Kurdoyev, binêre; perawêza hejmara 9'an.
(2') Bi taybetî ewen ku di arşîven Lenîngradê de hatine parastin.
' .' K.K.Kurdoyev, serokanîyê navê wê derbaz bû, rûpel; 386-387.
(3D Mebest ji vê, wergera Mamoste Hejarê şair e ku di wexte xwe de bi alîkarîya "Akademîya Zanyarî ya Kurd" çapkir.
30
MIJARA ÇARAN
KURD LI BA GORDLEVSKI
GORDLEVSKI (1876-1956)
Eva demek direj e Kurdnasî bûye beşekê dîyar a Rojhilatnasîya Sovyetê. Çend rojhilatnasên bi nav û deng ên Rusya de¬mek gelek dirêj bere Şoreşa Öktobrê ya sala 1917an, bingeha Kurdnasîya danhv '. Wisa lê hat ku beşek ji destê diduyan ê wê rojhilatnasîyê bibe hevçaxê du dewir û du rejimên cûda, yanî yên serdema Rusya ya berê Oktobrê û yên serdema Sovyetîstana piştê Oktobrê. Yek ji van rojhilatnasên bi nav û deng V.A.Gordlevskî bû.
(' Şarezayên me heta niha gelek berhemên bi feyde di derbaren Kurdnasîya Rusî û Sovyet de belav kirine û wergerandine. (Wek misal binere:
D.Ebdurehman Hacî Marif, "Di Warê Kurdnasîya de Rusya û Yekîtîya Sovyet", "Kovarî Korrî Zanyarî Kurd, hejmar, 1-2, 1974, rûpel; 499-568.
Tarîxu'l Istîşraq we el-Dirasatu'1-Erebîyye we'l-Kurdîyye fi el-Methefu'l Asîyewî we Me'ehede'l-Dirasatu'l-Şerqîyye fi Leningrad: 1818-1978, telîf mecmû'e min'l-musteşriqîn el-Sovyet. Tercemehû we 'elleqe 'eleyhî we qeddeme lehû el Dr. Maruf Xeznedar, Bexdad,

1980.
31
Vladîmîr Aleksander Gordlevskr ', roja 19'ê meha Çirya Ye¬ kem a sala 1876'an li bajarê Sivyaborgê ji dayîk bû. Bab û bapîrê (kala) wî efserên eskerî yên Çar û ji wan kesên xwenda yên dema xwe bûn, lêbelê wî rîya serbazîyê negirt û bi awayê xortanîyê hûlya Rojhilata kir sera xwe. Sala 1899'an li Mos¬ kova beşa Zimanê Rojhilat di Unîversîta Lazerîyev de temam kir, pênc sal şûn de liqa fîlolojîyê ya li ser Unîversîta Mosko¬ va qedand.
Gordlevskî, piştê vê, di sala 1907-an de, Unîversîta Lazerî¬ yev de bû mamoste, ji vir şûn de ket nav saheya nivîsîn, lêkolîn û hînkirinê. Bi vî awayî hîndekarîya ziman û dîroka edebiyata Tirkî jê re hat dan û di navbera neh salan de gihîşt dereca bilind a profesorîyê. V.A.Gordlevskî, di sala 1929-an de, bû endama yarîder ê Akademîya Zanyarî ya Sovyetê û di sala 1946-an de jî bû endamek çalak (aktîf). Salan dawî yên jîyana xwe bû serokê beşa Ziman û Edebiyata Welatên Rojhi¬ lata Nêzîk û Navîn a li ser Unîversîta Rojhilatnasî ya Aka¬ demîya Zanyarî ya Sovyetê.
Karan zanistî yên Vladîmîr Aleksandrevîç Gordlevskî, valatîyek mezin di kitêbxana rojhilatnasîyê de tijî kirîye. Hejmara wan karan digîhîje nêzîkî 300 gotar û kitêbên cûr bi cûr. Tenê Berhemên Helbijartî yên wî, çar cildên serbixwe ne ku bi ser hev de 2310 rûpelên mezin in(16x25 cm). Berhemên V.A. Gordlevskî berên bêxewî û zehmetîya pêncî salan bê sekin ên zanakî fedakar û zîr'ek in.
V. A. Gordlevskî, di berhemên xwe de ji hemû tiştî zêdetir

qîmetê bi ziman, edebiyat û dîroka Tirkan daye, bi taybetî
yên dewra Selçukî û Osmanîyan. Ji ber ku gelek ziman dizanî,
di tirkî de bi temamî şareza bû, serokanîyên behsên wî babet
babet û dewlemend in.
Bîhna be terefî, hessasî û zanistîyê ji berhemên wî tên.
V.A.Gordlevskî, berê Sere Cîhanê yê Yekem, di salan şerê de û
piştî temambûna wî, çend caran çûye nav erda Tirkîyê, gav bi
(' Ji bo nivîsîna kurtejîyan û çalakîyen zanistî yen
V.A.Gordlevskî, me feyde ji çend serokanîyên ansiklopedi û
pêşgotina Karan Helbijartî yen wî wergirtîye.
32
gav gelek navçan gerîyaye û di nêzîk de tekilîye bi axa, mîr,
gundî, karker, senetkar û fermanberen vî welatî re danîye.
Mebesta wî ya serekî ew bûye ku ji wan hîn zade zanyarîyan
werbigre û bi vî awayî berhemên xwe hîn zêdetir pê dewlemend
bike. Li gor gotinên şarezan ew kitaba di sala 1916'an de
bi navê "Tekstên Folklora Osmanî" belav kirîye, heta niha jî
emsalê wê tûne. Gordlevskî, rûpelên wê kitêbê bi wan stran,
beste, pend, gotinên bi nirx û metelokan tijî kirîye ku evan ji
deve xelke û di nav axa Tirkîyê de berhev kirine.
Zanayên, zehmeta bê rawestandin a Vladîmîr Aleksandrevîç
Gordlevskî gelek berz nincandine. Erebnasê bi nav û deng
û endama hejmarek akademîyên zanyarî yen welaten Rojhilat
ên wek Y.Yu. Giraçîkovskî di namekê taybetî de jê re goöye:
"Tu ne wek kesekî, heta derecek wek hemûyan
Di dîroka zanistî ya rojhilatnasîya me de bê emsal î".
Hemû ser hev, çar sal ser koça dawîya V.A.Gordlevskî de
neçû (roja 10'ê llona sala 1956'an koça dawîyê kir), Beşe

Dîroka ya Akademîya Zanyarî ya Sovyetê, roja 8'ê Kanuna
Duyem a sala 1957'an, biryarê belavkirina karan wî yên hel¬
bijartî derxist û ji bo cîbicîkirina vî karî han komîtekê taybetî
ya ji çend kesên şareza pêkhatî damezrand. Wek me got, ev
karan han ên V.A. Gordlevskî, di çar cildên mezin de hatin
berhevkirin. Cilda yekenr3' ji beşek berhemên xwedîyê wî
yên di derbarê dîroka qerna navendî ya Tirkîyê hatîye amade
kirin. Di cilda diduyan de(', ew lêkolînen ku V.A.Gordlevskî
di warê ziman, folklor û edebiyat de kirine, pêkhatîye. Helbijartîyên
zindrek din ji berhemên dîrokî yên V.A.Gordlevskî
li gel çend nivîsînên din ên babet babet di derbarê rewşenbîrî
de, li ber cilda sisîyan ketine . Behsên beşa dawîyê yen van
' ' Akademîya V.A.Gordlevskî, Karen Helbijartî, bi zimanê Rusî,
cilda yekem (Berhemên Dîrokî), Moskova, 1960, rûpel; 552.
(' Akademîya V.A.Gordlevskî, Karan
(Ziman û Edeb), Moskova, 1961, rûpel; 558.
(' Akademîya V.A.Gordlevskî, Karêr
(Dîrok û Rewşenbîrî), Moskova, 1962, rûpel; 558.
33
Helbijartî, cilda duyem
ai
Karen Helbijartî, cilda sayem
karan jî li ser warên etnografya, dîroka Rojhilatnasîyê û ber¬
hemên zanayên pêk têr '.
Di çar cild Berhemên Helbijartî yên V.A.Gordlevskî de
navê Kurd Kurdistan û hejmarek zede ji bajarên Kurdistanê
yên serdemen cûda û cûda derbaz dibin/
ÇEND RÛPEL JI DIROKA QERNA NAVIN A KURD:

Wek zanayek bêhempa, Vladîmîr Aleksandir Gordlevskî, xwe di qalikê Tirknasîyê de negirtîye. Ewî bi awakî gelek payebilind rola gelên Rojhilata, di dîroka jîyana mirov de nincandîye. Her wiha di meydana zanistî ya rojhilatnasîyê de jî destek wî yê berz hebû. Ji ber van sebebên û çend sebebên din ên wek van, gelek car qelema V.A.Gordlevskî bi nêzîk ve sînorên wan behsan ketîye ku peyvendîya wan bi dîrok, jîyana aborî, civakî û edebî ya gelê Kurd ve heye. Carên wisa hene, di berhemên wî zanayî de, em rasta rûpelên wisa yen dîroka Kurdan tên ku em bi xwe jî, gelek mbcabin ewqas jê nizanin. Ew rastîyên ku tenê li ser Kurdan yên di kitaba "Dewleta Selçukîyên Asya Biçûk" de nivîsandine, her çendîn hecma wan kêm be jî bi naveroka xwe dewlemend û bi qîmet in, bi taybetî hewce ye em vê yeka han jî ji bîr nekin ku ronîkirina dîroka Kurdan a qerna navîn karekî rehet nîne, ji ber ku piranîya wan berhe¬mên ku heta îro dîroknivîsên dilsoz ên me, yen di derbare wan dewran de nivîsandine, heta derecek perçe perçe û ji hev cîhê ne. Ez di wê bawerîya de me, zanyarîyên di nav kitaba "Dew¬leta Selçukîyên Asya Biçûk" de ne alîkarîya tijîkirina çend derz û valatîyên wê dîroka me didin ku pêwîst e bibe proja berhemekî mezin a dîwarojê.

Di sala 1941'an de, V.A.Gordlevskî kitaba xwe ya "Dewleta

(' Akademîya V.A.Gordlevskî, Karan Helbijartî, Cilda çaran (Et¬nografya, Dîroka Rojhilatnasîyê û Nincandin), Moskova,1968, rûpel 612.

(7)

y ' Wek mîsal, di cilda yekem de sê car navê Kurdistan û gelek caran jî navê bajarên cihê hatine. Tene Amed(Dîyarbekir) 15 car û

Bedlîs nezîkî 20 caran di we cilde de derbaz bûne.
34
Selçukîyên Asya Biçûk" belav kir/ ' Ji ber çend sebebên ev ki¬
taba han ji girîngtirîn berhemen V.A.Gordlevskî têt hesêb ki¬
rin. Dîroka Selçukîyên Asya Biçûk, behsek giran û gelek aloz
e, ji ber ku bi taybetî êrîşên bêeman ên Moxolîyan ên sedsala
13'an, bûne sebebê fewtîna gelek belge û destnivîsên bi qîmet
ên derbarê jîyan, dam û dezgên Selçukîyên. Lê V. A. Gord¬
levskî, bi alîkarîya serokanîyên tirkî, farisî, ermenî gurcî,
suryanîyên kevin û hejmarek gelek zade ji lêkolînên dîrok¬
nivîsên Awrupîyan, karîye gelek milên kur ên vê mijare bikole.
V. A. Gordlevskî, di 16 feslên wê berhemê de bi dirêjî
behsa Tirk, Moxol, Oxuz û eşîrên koçer ên Asya Biçûk ên di
navbera sedsala 16'an û sedsala 18'an, derebegîyên wan melbendan
ên eynê dewrê, jîyan û desthilata sultanên Selçukîyên,
pîşegerî, pîşesazî, bazirganî, bajar, gund, esker, ayînî, urf û
edetên Selçukîyên Asya Biçûk kirîye/ '
Selçukî ku yek ji wan eşîrên koçer ên Oxuzên Tûrkmen bûn, di
destpêka de di wan navçên Asya Navîn dijîyan ku dekevin
milê rasta rûbarê Zerefşan yê navbera Buxara û Semerkentê
(10).
Şivanên pîşeyî yên wî çaxî Selçukî bûn. Piştê wê, dor û berê
xelasîya sedsala 10'an, Selçukî Musilman bûn û piştê musilmanbûna
wan guhertinek mezin di jîyana wan de destpê kir, ji
ber ku, bi taybetî desthilata serokên wan di bin perda dînê de,
rehettir gîhîşt nav axa gelên Musilman ên Rojhilat. Ev yeka
han bi sera xwe bû sebebekî mezin a rakêşana Selçukîyên ber
bi Asya Biçûk ku beşekê mezin wî çaxî di bin desthilata Ebbasîyan

de bû.
(' Yekem behs e ku di Karen Helbijartî de belav kirîye, nêzîkî 300 rûpelên cilda yekem girtîye.
(' Binêre: V.A.Gordlevskî, Karan Helbijartî, cilda yekem, rûpel; 31-318.
' ' Ji bo kurtebehsa dîroka Selçukîyên, ji derveyê berhemen V.A.Gordlevskî, min feyde ji çend serokanîyên din jî wergirtîye, bi taybetî ji kiteba A.D.Novîçîyev, Tirkîye, Kurtedîroka Wê, bi zima¬nê Rusî, Moskova, 1965.
35
Di sedsala ll'an de, wextê ku Selçukî ber bi welatên Rojhi¬lata Nêzîk û Navîn de hatin, pêşîya hemû cîyan berê xwe dan Irane ku nezîkî wan bû.
Sala 1040'an de, hazên pêşeng yên Selçukîyên cara yekem ketin nav axa Irana û di navbera 15 salan de karîn desthilata xwe bigîhînin hemû navçeyan. Girtina Irana imkana Sel¬çukîyên zade kir, vê yeka han wisa lê kir ku bê wan bisilikînin, berê xwe bidin Iraq, Sûrîye, Azerbaycan, Kurdistan û Ermenîstanê. Di navbera salan 1042 û 1051 'an de, Selçukîyên karîn piranîya beşên Kurdistanê îşxal bikin û bikin ser dewle¬ta xwe ya fireh, piştê vê jî di sala 1055'an de bi îşxalkirina Bexdayê desthilata xwe hîn xurtkirin.
Bi vî awayî Selçukî, heta nîvê sedsala ll'an, gihîştin ser sînorê Asya Biçûk ku ji ber gelek sebebên dîqeta wan keşa bû. Asya Biçûk, welatekî fireh, dewlemend, xweş û kêmnifus bû, wî çaxî piranîya beşê wan navçan destê Bîzansîyên Isayî de bû. Demek bû fermanrewayên cîhana Islama li ser vê yekê difikirîn ku wê perça girîng ya rojhilata têkin destê xwe. Ji ber

ku ev beşa han bibû bingehek tehdîdê ji bo lsayîyan ku dixwestin bi vê rîyê re bigihîjin melbendên pîroz ên Filistînê. Serdarên Selçukîyên, dizanîn bi rehetî dikarin berê xelkê sade bidin ber bi wan navçan de ku dagîrkirina van deran, bêguman dibû sebebê belavbûna nav û dengê wan di nav seranserê cîhana Musilmantîye de.

Di nîvê sedsala ll'an de, yekem car Selçukî ketin êrîşbirina li ser Asya Biçûk, lê ji ber hazên Bîzansîyên êrîşên wan qonaxan perçe perçe û kêmencam bûn, piştê her êrîşekê naçar dibûn paş de bikişin. Her di wî çaxî de jî beşekê mezin ê şerên ku navbera Bîzansî û Selçukîyên de diqewimîn li ser axa Kurdis¬ tanê çêdibûn. Di salan 60'î yen sedsala ll'an de, karaktera êrîşên Selçukîyên a li ser Asya Biçûk guherî. Piştê vê, êdî destavêtin avakirina bingehên xwe qayîmkirin û cîbûnê di wan melbendên de ji xwe re damezrînin. Encama vê yekê bû ku di sala 1071'ê li nêzîkî Melazgirdê^1^ ya erde Kurdan eskerê (' Menazgirt.

36

Bîzansîyên şikand. Deh sal şûn de Selçukîyên Iznîkê îşgal ki¬ rin û kirin paytextê xwe. Sala 1085'an Izmîrê jî îşgal kirin ku bi vî awayî Dewleta Selçukîyên di Asya Biçûk de damezra û jê re Mîrnişîna (Fermanrewatî, Derebektî, Mîrîtî/Mîrektî-Elîşêr.) Selçukî têt gotin û ev beşa han ji beşek dewleta Selçukîyên a mezin pêkhatibû. Di sala 1116'an de Selçukîyên Asya Biçûk, bajarê Konyayê kirin paytextê mîrnişîna xwe, ji ber vê yekê jê re Mîrnişîna Konyayê jî têt gotin.

Mîrnişîna Selçukî ya Asya Biçûk hingî diçû berfireh dibû, bi taybetî piştî sala 1180'an gava ku Mîrnişîna Danişmendî ya

cîranê xwe ji holê rakirnr . Bi vî awayî desthilata Selçu¬
kîyên gihîşt wê derecê, vêca zêdetir ber bi rojava ve kaşan û
heta gihîştin wan navçan Asya Biçûk ên ku ketibûn li ser beh¬
re.
Bi vî awayî di dawîyê sedsala 12'an û destpêka sedsala
13'an de, dewletekê mezin a Tirkan di bin serokatîya binemala
Selçukî de, di Asya Biçûk de damezra. Ev dewleta han
dewra fermanrewatîya Sultan Elaeddîn Keykubate Yekem
(1219-1326) de gihîşt sevîya herî bilind a desthilat û pêşketinê.
Di bin sîya wî sultanî de behsa avahîyên Konya, Kay¬
seri, Sîwas û bajarên din ên Asya Biçûk ketibûn ser zimanên.
Li dor û bere nîvê sedsala 13'an li gel êrîşên Moxolîyan, roja
Mîrnişîna Selçukîyên Asya Biçûk ber bi avabûnê de çû. Heta
destpêka sedsala 14'an bi tevayî têk çû, bi taybetî piştî sala
1307*an li ser birek mîrnişînên biçûk hat par ve kirin. Gelek di
ser de neçû, Osmanî bûn mîratgirên wan û cîyê wan girtin.
Bi vî awayî Mîrnişîna Selçukîyên Asya Biçûk, karî desthi¬
lata xwe li ser navçekê fireh a Kurdistan, Erebîstan û Ermenîstanê
deyne ku dîroka serpêhatî û bûyerên wan bi hezar
milan ve peyvendîya wan li gel dîroka Kurd, Ereb, Ermen û
v ' Di sala 1067'an Danişmendan ku ev jî eşîretek Tirk bûn, karîn
mîrnişînekê serbixwe di navçê Bakûra Rojhilata Asya Biçûk de damezrînin
û bajarê Sîwasê jî bikin paytexte xwe.
Bi vî awayî dijîtîyek mezin di navbera Mîrnişîna Danişmendî û
Mîrnişîna Selçukîyên de destpê kir ku bi serkevtina Selçukîyên dawî
pê hat.
37
Rûman ve^ ' heye. Ji ber gelek sebebên aşkera, gelek mixabin

heta îro dîroknivsên me, qasî ku ez pê agahdar im, nekarîne yan jî ji wan re lênehatîye bi hindikî jî be destê xwe ber bi milê vê dîroka han de bikin. Dîroknivîsê me yê mezin Mamos¬ te Emîn Zekî, çend rûpel peyvendîya Kurdan bi Selçukîyên Irana û lraqe re ji me re ronî kirîye(^, lê gelek kêm nebe, lêkolînek bi wî awayî li ser behsa peywendîya Kurdan bi Selçu-kîyên Asya Biçûk ve nekirîye('. Tene Ebdulreqîb Yusif, di kitaba xwe de ku li ser Dewleta Dostkîyan e(', çend rastîyên bi qîmet ên wî çaxî yên li ser Kurdistanê anîye, ji ber ku dor û berê sala 476-478'e koçî(1083-1086'ê zayînî), dewleta Dostkîyan ji alîyê Selçukîyên Asya Biçûk de hat hilweşandin. Her wiha têt dîtin ku ev yeka han valatîyek aşkera ye, wek gelek valatîyên mezin ên din, bi vî awayî ronîkirina dîroka Kurdan a qerna navîn bi xebatekî dilsozane ya wekî Ferhad kirî, pê heye. Em mecbur in bi derzî bikevin kolîna çîyayê, da ku bikarin rêzên windabûyî yên dîroka wî çaxî peyda bikin. Car û baran ev rêzên han di nav berhemên rojhi¬ latnasên de tên dîtin ku em hewcedar in van yekan têkin ser xezîna dîroka xwe ya hejar a rojên borî. Hewce ye di vê quncikê de zanyarîyên wan serpêhatîyan bidin zanîn ku V.A. Gord¬ levskî di derbarê Kurdan ên dema Selçukîyên Asya Biçuk de berhev kirîye.

(' Dîroknivîsên Islama, navê Rumê li Bîzansîyên danîbûn. Navê bajarê Erzirumê (Erda Rum) jî her ji wir hatîye.

(' M. Emîn Zekî, Xulasetu Tarîxu'l Kurd we Kurdistan min 'Eqdemî'l-' Usûr î'l-Tarîxîyye Hette'1-An, werger M. Elî Ewnî, Qahîre, 1936, rûpel; 145-151.

(' Wek mîsal, binêre wan çend rêzên di derbarê erîşa Elaeddîn

Keykubate Selçukî yen ku anîye li ser Dîyarbekrê (eynî serokanî, rûpel; 158-159).
(16) Ebdureqîb Yusif, El-Dewletu'l Dostkîye Fi Kurdistanî'l-Wusta, Dirasete Tarîxîyye we lqtisadîyye we lctimaîyye we Hedarîyye, cilda yekem, Bexdad, 1972.
38
Dema ku V.A. Gordlevskî tê ser behsa dagîrkirina Kurdis¬tanê Bakûr a ji alîyê Selçukîyên de, wiha dibêje; eynî wextî Selçukîyên xwestin bigihîjin Gurcistanê, lêbele, hewildana wan di vî warî de vala çû. Qasek şûn de karîn bajarê Edîsa (Urfa) bigrin, lê gelek li ser de neçû ew ji kîse wan çû . Çi heye ku di cîyê wî de "karîn bigihîjin nav axa Kurdistanê, vî kara han ê dawîyê riya ji bo hatina Osmanîyan jî xweş kir"* \ Piştî ve, Selçukî di Bakûr û Başûr ve ketin nav axa Kurdis¬tanê û vêca xwe amade kirin ji bo îşxalkirina Amedê (Dîyarbekrê) ku wî çaxî di destê Kurdan Merwanîyan de bû. Selçukîyên, karîn vî bajarî han jî bigrin, lê gelek li ser de neçû, Amed bû sebebe dijîtîyê di navbera Selçukî û Eyubîyan de. Sultan Elaeddînê Keykubate Yekem*1 8^ bi lez dixwest Dî¬yarbekrê bigre, lê di vê daxwaza xwe de du car şikest. Çi heye ku di sala 1241'an de, kura wî Keyxusrevê Duyan*1 karî vî bajarî bigre. Ji bo ku bikare dilê xelkê bajarê Dîyarbekrê ber bi xwe ve bikşîne, Keyxusrev, fermanekê ji bo holêrakirina birek bac û seranan derxist, bi taybetî ewên kiribûn li ser kel û pelan, fêkî û sebzen nav bajêr, miroven sultan, van fermanan bi dîwarên mezin ên mizgeftan ve daleqandin.
Ji ber hawar û alozîya êrîşên Moxolîyan, Melik Kamilê Eyubî ku dijmine Selçukîyên bû, karî dest deyne ser Amede, lê

Hulagû Xan, cardin vî bajarî han da destê Selçukîyên bin serokatîya Keykawusê Duyem*20) û biraya wî Rukneddînê Kiliç
(17)
v ' Min hewil daye li gor imkana xwe bi giştî mebesten V. A. Gor¬ dlevskî bidim zanîn.
' ' Wek me got, Sulta Elaeddînê Keykubatê Yekem, di navbera sa¬ lan 1219-1236'an de fermanrewaye Mîrnişîna Selçukîyên Asya Biçûk bû
19 Sultan Xîyaseddîne Keyxusrev, di navbera salen 1236-1295'an de fermanrewatîye kir
* ' Sultan lzeddîne Keykawusê Duyem, di navbera salen 1249-1257'an de fermarewaye Mîrnişîna Selçukîyên Asya Biçûk bû.
39
Arslanê Çaran* '. Di sala 1280'an de, bajarê Amedê di bin destê Keyxusrevê Sisîyan de bû*2 '.
Çava Selçukîyên lê bû ku bi îşxalkirina Asya Biçûk desthi¬ lata xwe ne tenê li ser hemû cîhana Islama lê cîhana derveyê wî de jî deynin. Ji ber vê îşgalkirina Dîyarbekrê gelek hêja didîtin. Sultan Keyxusrevê Duyem navê xwe wiha danî-bû: "Qatilu'l-kefere we'l-muşrikîn we Sultan Ul-Rûm we Ermenîyya we Dîyarbekir we Surîya we emîru'l-sewahil"* '.
Di vê yeka han de heqe Sultan Keyxusrev hebû, ji ber ku îşxalkirina bajarê Amedê karekî hêşan nebû. Wek me di pêş de got, du êrîşên Elaeddînê Keykubatê Yekem ên li ser Amedê ser neketin, her çendîn Mîrnişîna Selçukîyên Asya Biçûk di bin serokatîya sultanekî wiha xurt de nejîyabûn jî. Maweyek baş Kela Amedê xwe neda dest û bencweda, heta yek ji serokên Kurd ê bi navê Ibn u'1-Dînar, di bin re li gel sultan li hev kir û

çekdarên sultan bi dizî ve gîhand nav kelê û bi vê rîyê re derîyên bajêr ji bo îşxalkeran heta pist da vekirin*24\ lşxalkirina bajarê Amedê ji alîyê sultana Selçukîyên de ewqas girîng bû û wisa lê kir ku dest bi rez, baxçe û bostanên nişteclyên bajêr nede. Ger ev yeka han nebûya, wek em dibinin dema Selçukî cîyek îşxal dikirin bi lez diketin reh û rîşen dar, daristan, rez, fêkî û hemû hebûnên wek van qir û talan diki¬ rin.

Aşkera ye Selçukîyên piştê vê bûyerê cîyê pê xwe di Asya Biçûk de qayîm kirin û bi tevayî desthilata girtin destê xwe; axa, beg, mîr û xelkên sade yên gelên din her yek ji wan ji ber sebeb û meramek, der û dorê wan hatin hev.

Di vir de dibû para Kurdan jî hebe. Yekem ji wan zanyarîyên

* ' Fermanrewatîya Sultan Rukneddînê Qiliç Arslan ê Çaran, dikeve navbera salan 1257-1265'an.

* ' V.A.Gordlevskî, Karen Helbijartî, cilda yekem, rûpel; 58-59, 183.

(23)

v ' V.A.Gordlevskî, Karen Helbijartî, eynî cild, rûpel; 60.

*24^ V.A.Gordlevskî, Karen Helbijartî, eynî cild, rûpel; 183.

40

V.A.Gordlevskî anîye, bi awakî taybetî vê rastîya han aşkera kirîye. Wek ew dibêje; wextê Sultan Elaeddînê Keykubatê Yekem*25^ çûye Ewbiruk, 500 evser û serhengên "Rusî, Gurcî, Kurd, Deylemî, Gurganî, Cjezwînî, Gurî*2°) û yên din çarmedorê wî de bûn. Xwîn ji çavên wî dibarî... di nav xelkê de rê ji Sultan re dihat vekirin..."*27).

Eynê wextî beşek mezin ji eskerên Selçukîyên Asya Biçûk ku

çaren wisa hebûn hejmara wan digihîşt 250 hezar kesan*28\ ji eşîrên Kurdistanê pekdihatin, bi taybetî jî ew eşîrên ku Ii Amed û der û dore wî dijîyan* '. Wextê tengavîyan de fermanrewayen vê mîrnişîna han, wek ku di serîhildana Baba lshaq de qewimî, pena dibirin ji bo alîkarîya çekdarên Kurd. Di netîca bindesti, zulm û baran giran ên bac û seranen dam û dezgen Mîrnişîna Selçukîyên, sala 1239'an agirê serîhildaneke berfireh û mezin Asya Biçûk girt. Koçer û nîştecîyên wan navçan bi hev re di navbera du salan de di wê serîhildana de beşdar bûn ku mirovekî fedakar yê bi navê Baba îshaq, serokatîyê jê re dikir. Baba lshaq, xwe nîvçe pêxember dihesiband, alîgirên wî bi jin û zarökên xwe ve ketin êrîşbirina li ser mal, zevî û hebûnên derebegên mezin.

Piştî vê, qasek şûn de, şoreşgeran berê xwe dan eskerên mîrî û serîhildana wan di bin banga xelîfetîya Baba lshaq de wisa belav bû, dikir ku sabuna teke bina pê Mîrnişîna Selçukîyên Asya Biçûk. Wî çaxî Sultan Keyxusrevê Duyem ket tirsê "ji Melatyê daxwaza alîkarîya Tirk û Germîyan kir". Mebesta Sultan ji Germîyan ew eşîra Kurdan bû ku pist re mîrnişînekê bi hêz damezirandin*3. Bi vî awayî Sultan karî bandorîya

(25) Binere: nota 18'an.

*2 ' Eşîreteke Afxanî ye.

*27) V.A.Gordlevskî, Karen Helbijartî, cilda yekem, rûpel: 188.

* ' V.A.Gordlevskî, afirandina navê we derbaz bû(A.N.D.) rûpel: 10.

*29) V.A.Gordlevskî, a.n.d. rûpel: 79.

(30) V.A.Gordlevskî, a.n.d. rûpel:178-179.

41

xwe li ser kesên dijî xwe tesîs bike, Baba Ishaq hat girtin û îdam kirin, qasek şûn de jî hemû serîhildan hat tefandin.
Di kitaba "Dewleta Selçukîyên Asya Biçûk" de, Vladîmîr Aleksandrovîç Gordlevskî çend zanyarîyek girîng di derbarê rola şaristanîyetî û rewşenbîrîya Kurdan wî çaxî kirîye. Wek têt zanîn, Selçukîyên di Dola Zerefşanê, welatê xwe yê ye¬kemin de, bi koçerî jîyana xwe didomandin, perwerdekirina heywanan û hinek kist û kal (zîraet) kara wan ê serekî bû. Wî çaxî peywendîya patrîyarkî (babatî) di nav wan de hebû, pişta xwe bi yek û du qayîm kiribûn. Ji ber vê, dema ku gihîştin navçan Asya Biçûk hîn di hêla şaristanîyetê de gelek paş de bûn, ji bo vê gelek tiştan ji mele û derwêşên Kurd, Ereb û Azerîyan hînbûn. V.A.Gordlevskî di vî warî de wiha nivîsandîye:
"Ew derwêşên ku dihatin Asya Biçûk, tenê mamoste û fêrkerê ayînî nebûn, belko eynî wextî de dibûn rênîşanderê kargerîn û rewşenbîrîya koçêrên wan melbendên. Evan rolek baş ji bo yekîtîyê diliştin û xelkê wan navçan dijî Moxolan hîşyar dikirin..
Di çar riyan re derweş dihatin navçan Asya Biçûk:
Xoresan, Azerbaycan, Suriye û Iraq.. Derwêşên Iraqê ji Bexdad û Hewlêrê dihatin, cotkar, senetkar û bakar, der û doren wan dicivîyan"* '. Van derwêşên han di serîhildana Baba Ishaq de jî rol lîstine. Cardin V.A.Gordlevskî dibêje: bîr û bawerîya ayînî dijî sofîzmê ji Hewlêr digihîşt Asya Biçûk, "nişteclyên Hewlêrê Kurd in, wisa dixuyê wî çaxî meyîldarê şîîtîye bûn" (32)
Şûnewar, kelepûr û belgên di cî de mayî yên dewra Sel¬çukîyên Asya Biçûk, bi giştî kêm in. Yek ji wan belgên di cî de

mayî yê wê dewrê, mîhrabek a di mizgefta Elaeddîn a li baja¬
rê Konyayê ye ku li ser textê wî hatîye kolandin û dibêje;
"Hacîyê xelkê Xelatê(Exlat) di sala 11 55'an de çêkirîye". Li
gor qeneeta V.A.Gordlevskî, ev mihraba han di wextê xwe de
ji Xelatê birine bajarê Konyayê, paytexte Mîrnişîna Selçu-
(' V.A.Gordlevski, eynî serokanî, rûpel; 204
(32) V.A.Gordlevski, eynî serokanî, rûpel; 204-205
42
kîyan* \ Her wiha di sala 1183'an şun de wênên ejderhan ên
li gor ûslûba Çînê ser derîyên Amed hatine kulandin ku ev
yeka han jî baş dide ronîkirin ku berê êrîşa Moxolîyan, wek
têt gotin, ne di rîya wan re ev hunera han gihîştîye Asya
Biçûk*34).
Ji bo lêkolîna peyvendîyen derebegî yên di navbera Sel¬
çukîyên Asya Biçûk, ji ber sebebê nebûna serokanîyên kevin,
Vladîmîr Aleksandrevîç Gordlevskî çend caran pena birîye
ber hebûnen îro yên Kurdistanê. Di vê rîyê re V.A.Gordlevskî
hewil daye gelek milên jîyana sîyasî, aborî û civakî ya
Mîrnişîna Selçukîyên Asya Biçûk ên wî wextî ronî bike. Li gor
bawerîya V.A.Gordlevskî, ev yeka han yekemin rê ye ji bo têgihîştina
milên cûr bi cûr ên jîyana aborî û civakî ya dewra
Selçukîyên. Ji ber ku li gor qeneeta wî, ferqîtîyek bi wî awayî
di navbera jîyana Kurdistanê Bakûr ya destpêka sedsala
20'an û jîyana Asya Biçûk a qerna navîn de nîne* \ Di vir de
V.A.Gordlevskî, feyde ji çend serokanîyên nû yên Tirkî wer¬
girtîye, wek wê kitaba Naşit Hakkî ya di derbarê navça Dêrsimê
ya piştê tefandina serîhildana mezin a Şêx Seîdê Pîranî
nivîsîye*3°\

V.A.Gordlevskî dibêje; Selçukîyên di wextê xwe de bi şev ji tirsa êrîşên koçeran, derî û derwazên bajarên qayîm dikirin, ev adeta han heta dawîyê salan rejima Osmanîyan li bajarekî wek Dîyarbekrê dihat domandin* '. Dema ku tê li ser

*33) V.A.Gordlevskî, a.n.d. rûpel: 160.

*34) V.A.Gordlevskî, a.n.d. rûpel: 164.

*35) V.A.Gordlevskî, a.n.d. rûpel: 96-97.

*36) Naşît Hakkî, Derebeyi ve Dersim, Ankara, 1932. Xwedîye ve kitabe, ev kiteba xwe wek zincîrek gotar di rojnama "Hakîmîyetî Millî" de belav kirîye. Hejaye gotine ye, A.D.Novîçev, kurtîya ve bi zimanê Rusî belav kirîye (binere; A.D.Novîçev, "Derbare Mesela Derebegî Li Kurdistanê Tirkîyê", Kovara Bibliyografya Rojhilat, Leningrad, 1934, rûpel: 54-64).

*37) V.A.Gordlevskî, Karen Helbijartî, cilda yekem, rûpel: 153-154.

43

behsa muqayesa eşîrên koçer ên Asya Biçûk, nimûneke ji Kur¬distanê tîne û wiha dibêje: Berê destpêkirina Şerê Cîhana yê Yekem, Tehrane hakimekî nû ji bo navça Urmê şand, lê vî kesî han ji tirsa êrîşa koçerê li wan deran heta sê mehan nekarî ji Tebrîzê xwe nizîkî Urmîyê bike* .

Her di wê kitêbê de V.A.Gordlevskî, rastîyek girîng di der¬bare rewşa demografik û netewî ya Asya Biçûk ya dema Selçukîyên weşandîye. Di vî warî de wiha dibêje; jîyana Oxuzên Asya biçûk sade û yek cur nebû, her çendîn ew "Musilmanên xirab bûn", lê ayîn di wan navçan de ku piranîya nişteclyên wan Isayî bûn, bûye mertalekê mezin a parastinê. Çi heye di wan navçan Rojhilata Anadolê de ku piranîya nişteclyên wir

Kurd û Ereb û wek wan Musilman bûn, carên wisa hebû ku bi hêsanî di bin desthilata wan de dihelîyan*39\
V.A.Gordlevskî, di berhemên xwe yen din de jî çend carek li ser behsa dîroka Kurd a qerna navîn sekinîye. Di wê gotara de ku di sala 1922'an de li ser "Jîyana Çjizilbaşên Asya Biçûk" weşan-dîye* \ rastîyek li ser Mele îdrîse Bedlîsî heta îro ku nedihat zanîn nivîsandîye.
Di vir de dema ku tê ser behsa dijîtîya navbera Şah Ismaîle paşaye Sefewîyan(1502-1524) û Sultan Selîmê paşaya Osmanîyan (1512-1520) ku peta agirê ve dijîtîya piranîya navçan Kurdistanê girtîye, behsa kuştina bi xwînî ya Sultan Selîm a di nav Qizilbaşen wan navçan de dike. Di vî warî de wiha dibêje: Sultan Selîm bû sebebe kuştina 40 hezar kesan. Bi vî awayî didomîne: Mele ldrîs p tagirê Sultan Selîm bû, di wan rojan de gelek bi rikoyî dijî Cjizilbaşan sekinî, bi taybetî ewen ku di mintiqên Merdine de nişteçî bûn. Li ser fermana wî kum û serpêçen Qizilbaşan berhev kirin û bi van, çalan dor û berê bajêr pe tijî kirin.
V.A.Gordlevskî di ware kirinen Mele ldrîs de wiha di¬ domîne:
(38) Eynî cild, rûpel: 174-175.
*39) a.n.d. , rûpel: 73.
(40) aji.d. , rûpel: 255-275.
44
"Li gor bawerîya min kirinek herî ecêb eva han e ku mirovek nikare lêkolînê ser bike: gorra Husameddînê babe Mele ldrîs li Bedlîsê ye, wek li Bedlîsê ji min re gotin, Husameddîn, mirovek xwedî bîr û bawerîyek teng nebûye* ' ... "*42\

Di berhemek din de Gordlevskî, cardin hatîye li ser behsa Husameddînê baba Mele Idrîse Bedlîsî û wiha dibêje: "Le kolîn li ser Cjuranê kirîye, li gora qeneeta wî wiha bû; Musil¬man û lsayî wek hev diçin Cennete. Bawerîya wî bi Cehenne¬me hebû, le digot ezîyetdana Cehennemê karekî muweqqet e (demî ye), yanî bi çava E'rafê*43' li Cehennemê dinêrîya". Husemeddîne baba Mele ldrîs, li bajarê Bedlîsê veşartîye û gora wî bûye zîyaret* '. V.A.Gordlevskî di derbare Mele ldrîs bi xwe de jî wiha dibêje:

"Hemdemê Sultan Selîmê Yekem, dîroknivîsekî alîgir (pesndayox) *45^ û mirovê dewleta, yanî sîyasî bû"*46)

LI SER QIZILBAŞÎ Û ÇjlZILBAŞAN

Vladîmîr Aleksandrevîç Gordlevskî, di nivîsînên xwe de qîmetek zade daye Ojzilbaşen Asya Biçûk ku beşek ji wan Kurd in. Li ser ayin, urf û adet û dîroka wan lêkolîn kirîye, çend carek bi wan re tekelî danîye, gelek zanyarîyên bi feyde û eceb di derbarê wan de berhev kirîye û di çend berhemên xwe de weşandîye.

* ' Mebesta wî ew e ku Husemeddîne ser Mezhebe Sûnnî, mirovekî bîr û bawerteng nebûye, mirovekî riya dîn de bûye.

*42) V.A.Gordlevskî, Karen Helbijartî, cilda yekem, rûpel: 256.

(43) -g-jaf ya "Medher" gotinek dînî ye, ji wî cî re tet gotin ku dikeve navbera Cennet û Cehenneme. Nave gotina "E'raf' , di Cnirana pîroz de hatîye.

(44) VA.Gordlevskî, cilda yekem, rûpel: 391.

(45)Muerrix Meddah.

(46) V.A.Gordlevskî, cilda yekem, rûpel;:391.

45

Yekem berhemê V.A.Gordlevskî di derbarê Cjizilbaşan de, di Berhemên Helbijartî yên wî de bi vî navî ye: "Gera Min a Li Ser Behsa Ayînên Asya Biçûk-Qizilbaşî". Ev berhemê han ji gotarek pêkhatîye ku di sala 1913'an de, di akademîyek zanistî ya taybetî de xwendîye* '.

V.A.Gordlevskî, di destpêka gotara xwe de axaftinek xwe ya li gel Elîşanê kura Mehmud Paşaya serokê Eşîra Qoçgirî ya navça Zarayê* °' weşandîye.Li ser Mehmud Paşa wiha di¬bêje; serokê eşîra bidesthilat ya Qoçgîrî bû ku yek ji wan eşîrên Kurd ên wan navçan e. Ew, "dadkar û fermanrewayê eşîra xwe ye, çi tişta ew bêje ji bo Kurdan qanun e". Di sala 1895'an de, dema kuştina Ermenîyan, Mehmud Paşa rê neda mirovên wî di wan kuştinan de beşdar bin, ji ber vê yekê Er¬meni bi çavekî rêz û xoşewîstî lê dinêrin.

V.A.Gordlevskî di vî warî de wiha didomîne:

"Min hatina vî axayî han firset dît da ku bikarim pê re biaxivim û bikarim di rîya wî re bigihîjim çend nihênîyên Qizilbaşan. Xwedîyê qonaxa min her çendîn di vê yekê de dudil bû, lê biryar da ku alîkarîya min bike û min bibe li ba wî. Piştî çarîk seet şûn de min bir odekê tenha û deri ser min de girt. Dema ez ketim hundir xortekî bejnbilind, bi cil û bergên Awru¬pî û rêk û pêk, ji ber min ve rabû. Wi çaxî ku Meha Remezane bû, ez jî yekser ketim behsa rojîyê. Min jê re got; Qizilbaş îtîraf bi meha Remezanê nakin, ew 12 rojên Muherremê tenê rojî dihesibînin, van rojan bîranîna tînîtîya Huseyn a li Biyabanê Kerbelayê dikin. Dema min daxwaz jê kir ku behsa Xizir llyas ji min re bike û min jê pirsî kengî destpê dike, reng lê çû, got "ev nihênîyek taybetî ye, ez ê paşa behsa wî ji te re bi¬

kim". Wî çaxî ez têgihîştim ku OJzilbaş heta çi derecê dev
girtî ne.
Wisa dixuyê ku V.A.Gordlevskî, nekarîye tiştek wisa ji
Elîşan hîn be, ji ber vê mecbur bûye di rîya mirovek Ermenî de
*47) a.n.d. rûpel: 241-254.
' ' Zara dikeve Başure Sîwase.
46
bigihîje hinek Qizilbaşên din û beşek zanebûn di derbare wan
de berhev bike. Wekî ku dibêje, yekî jê re gotîye Qizilbaş di
nav xwe de hev û du baştir nasdikin, yanî her yek ji wan li
gora xwe tesîrek wî heye, ji ber vê yekê, kes nabînin.
V.A.Gordlevskî ku têt li ser behsa rî û simbêlê OJzilbaşan,
wiha dibêje: piştê sî salan rî berdidin û êdî kurtnakin, "yên
wisa hene bi mûyê rîyê wan mirov dikare şalvarek çêke".
Wek jê re hatîye gotin, li ba Sunnîyan rîkurtkirin rewa ye. Vê
yeka han jî jê re gotine: çawan xêr di hîştina rî de heye, ji ber
ku heryek mûyek melekek li ser heye, ji ber vê kurtkirina wî
di cî de nîne. Pişta van gotinên bi du "belgên" qayîm dikin; a
yekem, gûya wexte Imam Elî, Pêxember şûştîye av di navka
wî de berhev bûye ku xwestîye wek teberik vê ava han vexwe,
rî û simbêlê wî şil dibin û ji ber vê yekê êdî heta mirinê kurtnekirîye.
Belga duyem; ji bo "rîyê dirêj" a Isa Pêxember e.
Nivîskar, hejmara Qizilbaşên Tirkîyê mîlyonek hesab kirî¬
ye, li gor qeneeta V.A.Gordlevskî ev hejmara han ji bo destpê¬
ka sedsala 20'an kêm e, bi taybetî wek dibêje, hewce ye em vê
yeka han jî jibîr nekin ku di Asya Biçûk de gelek Qizilbaş
hene. Navcergê melbenda Qizilbaşan Dêrsim e û serokên wan
yên mezin jî li vir rûdinin. Lê li Başûrê Asya Biçûk de jî mel¬

bendên wan yên taybetî hene. Her wiha li Stenbol, Bursa û Kilîkya jî Qizilbaş hene, piranîya wan di van navçan de sen'etkar in. Ojzilbaş li bajarê Dîyarbekrê jî dijîn.

V.A.Gordlevskî yê ku bi xwe çûye navça Xinisê, lîstek tay¬betî yên gundên Qizilbaşên wê navçê çêkirîye. Li gor wan zanyarîyên ku Lînç di dawîyê sedsala 19'an de weşandîye, hej¬mara gundên navça Xinisê ku navçek Kurdewarî ye, tenê 15 ye. Lê li gor lîsta V.A.Gordlevskî, 35 e. V.A.Gordlevskî, navê wan gundên û hejmara malan wan weşandîye. Lîsta wî bi vî awayî ye:

Oelacuk	mal
Germek	
Kemser	
Siwarem	
Meydan	
Heyran	
25	
6	
12	
30	
20	
12	
47	
Derek	8 "
Gewereş	10 "
Mêrgesor	50 " û

Xelîfekî 30 mal in. Wek dibêje, vê lîsta han di salan Şerê Cîhana yê Yekem de çêkirîye, yanî piştî ku eskerên Rusya

gihîştine wan navçan. Li gor axaftina V.A.Gordlevskî, hatina eskerên Rusya bûye sebebê we ku gelek aîlên Kurdan Sûnnî yên wan gundên ji tirsan bar bikin* '.

Eynî wextî Vladîmîr Aleksandrevîç Gordlevskî, hewil daye ku ji hemû firsetek istifade bike, ji bo berhevkirin destan, efsane, gotinên pîşîyan, çîrokên bi nav û deng ên nav Qizilbaşan, Kurdan û gelen din en ku di seransere Tirkîyê de dijîn.

DESTAN, EFSANE Û ÇÎROK

Wek me li jor jî got, V.A.Gordlevskî, gelek qîmet bi berhevkirina folklor daye. Şarezen vî warî, berhemên folklorî yen wî gelek hêja dibînin. Gordlevskî, çûye kîjan navçe, tiştên bi devkî yên di nav nişteclyên wê de yên bi nav û deng berhev kirîye û pist re jî gotaran taybetî de weşandîye. Li gor van prensîban, dema ku çûye navçan Kurdistanê jî bê rawestandin van cure berhemên han berhev kirîye* '.

Rast e, ewen di navçan Kurdistanê de berhev kirîye, gelek nînin, lê tiştên seyr û balkêş di nav de hene. Wek mîsal: dema ku çûye Bedlîsê, li ser binecî û bingeha danîna vî bajarî ev tiştên han jê re gotine:

Avakirina Kela Bedlîsê :

Wexte ku Iskender nêzîkî Bedlîsê bû, keleka ase xuyakir, derîyê kelê li ser wî û eskerên wî hatibû girtin.

Yek ji mirovên Iskender e navî wî Ebu Leys, vê kela han ava

* ' V.A.Gordlevskî, Karen Helbijartî, cilda yekem, rûpel: 260-261.

* ' V.A.Gordlevskî, sala 1916'an çûye bajarê Bedlîsê û wek bi xwe dibeje, demek direj li wir maye (binere: rûpela 383'an a cilda yekem,

48
kirîye. Ebu Leys, li dijî Iskender çek bikar tîne, lê eskerên Iskender ji yên wî xurttir bûne, ji ber ve yekê di netîcê de xwe didin dest. Ji ber asêbûna vê kela han û gelek bi zehmetî sitendina we, Iskender, gûya di rikoyî de navê we dike Bedleys (Bed+Leys) ku niha bûye Bîtlîs*51).

Wek têt zanîn gelek car rûpelên ronak ên dîroka gel, têkelê nav civaka xelkê dibe û wek folklor bi devkî ber bi pêş de be¬lav dibe. Yek ji wan çîrokên ku V.A.Gordlevskî bi navê Şahabeddîn belav kirîye, bûyerekê sade û nemir a serîhildana Mele Selîm Efendîyê Hîzanî ye û demek kurt berê destpêkirina Şerê Cîhana yê Yekem qewimî*52). Yek ji xelkê Bedlîsê bi vî awayî çîroka Şahabeddîn jê re gotîye:

"Şahabeddîn: Sê şêx li Xinisê dijîyan, diduyê wan; Şaha¬beddîn û Mehmed Şirîn bira bûn û kûren Seyîd Muhemmed bûn. Yê sisîyan Seyîd Elîyê kura Celaleddînê kura Xews (Xaws) bû, mirovekî xeybzan bû, ji Xinisê ve dizanî çi li Bexdad diqewime. Seyîd Elî xwe ji bo axretê sipartibû, ji nimêj û rojîyê pê ve tiştek nedizanî. Şahabeddîn û Mehmed Şirîn jî xwe ji bo xizmeta xelkê amade kiribûn.

Şex Şahabeddîn, delalê dilê feqîr û bêkesan bû, heft tendurên hilkirî ji bo nandana xelkê amade kiribûn. Gelek rez, zozanên fireh û hezar serî dewarên Şahabeddîn hebûn, hemû di bin xizmeta xelkê de bûn.

Carek çar pel serbaz hatin Hîzanê, Şêx Şahabeddîn bê minetî xwarina tevan daya, dijminên wî gelek gotin li ser wî zade dikirin, digotin van peran bi belaş û zorî distîne. Lê qet feydek neda. Agirê şerê di navbera Kurd û Osmanîyan de hilket.

Şêx biryarê da biçe Rusya, mbcabin firset neketê, esîr hat girtin. Her sê şêxan anîn Bedlîsê û li ber Konsolosxana Rusya îdam kirin. Şêx, berê wefata xwe nifiran li Osmanîyan kir, duaya wî zû bicî hat, alozîyê destpê kir û şerê gişti yê cîhana

(51) V.A.Gerdelvskî, cilda yekem, rûpel: 388.

(52) Di vî warî de binere: Dr.Kemal Mezher, Kurdistan Di Salen Şerê Cîhane Ye Yekem de, Bexdad 1975, rûpel: 43-45, 75.

hilket* . Piştî wefata wan, hemû kesan Şêx Şahabeddîn bibîr dianîn, heta carek keçek Ermenî di pencera mala xwe de çirayek li ser kala tirba Şex dît. Keçik ma ecêbmayî, bû sibe çû ser tirba Şêx û îman pê anî. Ji wî rojî şûn de Musilmanan gorra şêx kirin zîyaretgah. Ermenîyan gelek lome li keçikê kirin. Rojên înan nişteclyên bajêr diçin zîyareta meqbera Şex Şaha¬ beddîn"*54).

Destanên bi nav û deng en Rojhilat di nav Kurdan de jî be¬ lav in û qalibên xwe yên taybetî girtine. Li Bedlîsê behsa "Çîyayê Nemrude" bi vî awayî ji V.A.Gordlevskî re gotine:

"Hebû û tunebû, paşayek desthilat hebû, navê wî Nemrud bû. Gelek dewlemend bû. Ji bajarê Tetwanê yê mezin karwan jê re dihatin*). Nemrud gelek bi zû li ser xwe çû, keleka bilind durust kir, dbcwest biçe li ser vê kelê û bi Xwedê re şer bike û goya wî bikuje. Xwedîyê mezin xezebê lê kir û mêşek kir muselletê sera wî, mêş di kuna kepîyê (poza) wî re çû ket nav mejîyê wî. Vizînîya mêşê sera wî bir. Nemrud, ferman da mirovên xwe û bi takan sera wî bixin û belkî mêş jê bê der, lê çare nekir û mir.

Bi emrê Xwedê mûrî ketin bin kelê û bina wê kolan û hilweşîya.

Heta kevirên hîmê wê jî avêtin nav ava Dîyarbekrê
56). Bi vî awayî li ser xwe çûyîna Nemrud dawî pêhat").
Bi eynê prensîbê, V.A.Gordlevskî, çend berhemen folklorî di
derbarê bajar û şûnewarên bi nav û deng ên Kurdistanê û serpêhatîyên
wan de berhev kirîye ku aşkera ye şarezayên van mijaran
di rîya van de dikarin bigihîjin hinek netîcan. Evên xwa-
*) Mebesta wî Şerê Cihana ye Yekem e.
*54) V.A.Gordlevskî, cilda yekem, rûpel: 391.
*ö ' Tetwan, bajarekî Ermenîyan bû. Li gor cilda çaran a Seyahetnama
Ewlîya Çelebî, nave wî di esle xwe de 'Texte Wan" e, yanî li
ser Wane bûye û di nav Kurdan de bûye Tetwan.
(56) Li gor Ewlîya Çelebî, Şah Tehmasb di sedsala 16'an de, Tet¬
wan kavil kir.
(57) V.A. Gordlevskî, cilda yekem, rûpel: 391-392.
50
rê jî çend ji wan nimûnan in.
"Gola Wanê Çawan Çebû: Di gelek rojên kevin de, di nav
wan navçan de kanîyek mezin hebû. Li nêzîkî wê kunek hebû û
ava kanîyê tê de winda dibû. Carekî ji caran jinek li wir hirî
dişo, çengek hirî ji destê we dipeke û diçe dikeve ber kune,
dixitimîne û bi vî awayî av zade dibe Gola Wanê çêdibe"*).
"Dagirkirina Xelate: Wextê Pêxember bang ji bo Islamîyete
kir, daxwaz ji putperestan kir ku dev ji putperestîyê berdin,
yek ji hevreyên wî ku navê wî Xalid bû, li gel 40 hevrêyen xwe
bere xwe da Xelatê (Exlet). Bi navê bazirganîyê ketin nav ba¬
jêr û bi vê bahana tê de man. Pist re şer qewimî û Xalid hat
kuştin û her li vir jî hat veşartin "(59).
"Dîroka Xelate: Heft paşan fermanrewatîya Xelatê diki¬

lin, Hesen, Beyandir û pêncên din. Hesen, mizgeftek di nav ba¬
jêr de ava kir, Beyandir, xezînek gelek mezin pê xwe de hîşt
ku niha nema ye. Hesen û Beyandir, kelek jî avakirin, ji wir
ve çaverîya êrîşên dijminên xwe dikirin. Wan çaxan Xelat
bajarekî gelek mezin bû. Dema heft-heşt hezar kes ji Xelat
diçûn Surîyê*60), qet tu valatîyek jê nedihat dîtin"*61).
Ev cure berhemên folklorî beşek in ji samanên rewşenbîrîyên
me yên kevin ku di nav hemû gelan de yên wek van hene,
pêşkevtinê baş diparezin. Bêguman, bi gelemperî feyda van
berhemên han ji bo rewşenbîran û bi taybetî jî ji bo zimanzanan,
dîroknivîs û zanayên edebiyata gelek heye. Feydek din jî
yên van berhemên han heye ku dikarin bibin serokanî ji bo
edebiyat û çîrokên zarokan. Her ji ber van sebebên, di wextê
xwe de "Akademîya Zanyarî ya Kurd", qîmetek girîng ji bo
berhevkirina van cure berhemên folklorî da.
V.A.Gordlevskî, di nivîsên xwe de dema ku tê ser behsa
navçan Tirkîyê yên din, ber bi van re car û caran cardin vedigere
ser navê Kurdan. Wek misal di derbarê bajarê Erzirume
(58) a.n.d. , cilda yekem, rûpel: 392.
(59) Cilda yekem, rûpel: 392.
*) Mebesta wî hatin û çûyîna koçeran e.
*61) V.A.Gordlevskî, cilda yekem rûpel: 392.
51
de wiha dibêje: di nav nişteciyên wî de belav e ku goya welatê
wan di wextê xwe de sê sal li ser hev rasta zivistanekê gelek
giran hatîye û ev yeka han bûye sebebê nemana piranîya xelkên
wî. Wek dibêjin, tenê 600 mal ji destê mirinê karine xwe
xelas bikin. Di wan navan re Elî Axa yê Kurd û 12 hezar mirovên

wî di nav wan navçan de nişтecî bûne* \
V.A.Gordlevskî, wek me got, gelek çîrokên di nav xelkê de belavbûyî weşandîye ku ji wan hejmarek kêm peywendîya wan bi Kurdan ve heye. Di cilda yekem ya Berhemên Helbi¬jartî yên xwe de, van herdu çîrokên han belav kirîye:
"Muştaq Baba: Di wextê xwe de ku Muştaq Baba cîgirê melaya mezin Hacî Hesenê Şêrwanî bûye, çûye Stenbol, daxwaza wî ew bûye Sultan Ebdulmecîd bibîne. Dema dizane ku nimêja înê li mizgefta Eyyub dike, bi siwarî bi mirovên xwe yên Kurd ve berê xwe dide mizgefta. Wextê gihîjtîye wir, Sultan li miz¬gefta bûye, paçana siwarên Kurdan bala wî dikişine û ji pîremê-rek dipirse, gelo ev kî ne hatine xizmeta me? Dema Muştaq Baba têt jorê, Sultan jê re dibêje: Te ji bo çi zehmet kirîye?
Muştaq Baba di bersîva xwe de dibêje: Muştaq bi dîtina te yê mezin bûm. Bi vî awayî navê xwe têkelê bersîva xwe dike* \
Sultan, bang dike dîwanxana xwe ku cîyê nimêjê jî li wir bûye. Sultan, ji Muştaq Baba daxwaz dike ku ji xeybê tiştek jê re bêje. Muştaq xwe demek gelek dirêj digre û da ku heta Sul¬tan jê bipirse.
Çi hat bîra te?
Muştaq Baba dibêje:
"Niyaza te ew e ku tu Guneşê bidî min, yek ji wan jinên herema te ye û dê netîcê de jî bibe sebebê kuştina min".
Sultan jê re dibêje:
"Ca eðer wiha be ez dev ji biryara xwe berdidim".
"Na ez dexîlê te me, Xwedê wiha hez kirîye" -hawar ji Muştaq Baba diçe.

*62) Cilda yekem, rûpel: 395.
*) Ji ber ku gotina "Muştaq" bi du manan de bikaranîye.
52
Sultan razî dibe, Gûneş li Muştaq Baba mehr dike. Piştî ve ku Muştaq Baba vedigere Bedlîsê, hemû kesên li wan deran bi çavekê rikoyî li Muştaq Baba dinêrin, ji ber ku Sultan gelek zevî û erdên wê navçê jî jê re dibexşîne.
Gelek ser de naçe cardin Muştaq Baba biryar dide da ku biçe Stenbol. Dijminen wî dizanîn ku vê cara ji ba Sultan dê bi text ve vegere, biryarê kuştina wî didin. Ji bo vî karî jî çend Kûr¬deki ji eşîra Ferîq Behrî Paşa kirî dikin û ew mirovên kirîgirtî gav bi gav pê dikevin. Muştaq Baba li Bayezîdê li qonaxê serokê bajêr radikeve. Dema roj diçe ava Muştaq Baba dev ji nimêjê berdide û berê xwe dide hevalê xwe Şêx Arif û jê re dibêje:
"Tu dizanî dê niha çi biqewim e? Ew dê min bikujin, nebe tu dengê xwe bikî, roja min temam bûye. Xwedê wiha hez dike, ez dexîlê te me, dema ew bên jorê û pirsa min bikin, nebêje li vir nîne, hekene dê te jî bikujin Şêx Arif.
Muştaq Baba, dema axaftina xwe temam dike, axînek dikêşe, çend beyt dinivîse û dike bina bermalê. Wextê Kurd tên jorê, Muştaq Baba pênc deqîqe musaede ji wan disfine, destmêj digre, nimêj dike û vêca bê tirs berê xwe dide wan û ji wan re dibêje:
"Ez amade me, fermo min bikujin".
Gora Muştaq Baba niha li Bayezîdê ye, li hemberê qonaxa serokê bajêr e. Her çendîn kala gora wî ya mezin rast dikin ew cardin xwar dibe, wisa dixuyê ew secde dibe.

Li gor Elî Paşaya kura Muştaq Baba ku ewî bi xwe ji me re got, ev bûyera han di nîvê sedsala 13'ê koçî, yanî salan 50-60'ên sedsala 19'an a zayînî qewimîye. Elî Paşa gelek methê dîwana bapîrê xwe dikir û digot: belkê tenê Hafiz (mebest Hafizê Şîrazî ye -Elîşêr) ji wî şaîrtir be"* \
'Tambuk Baba: Carek mirovek li Aksarayê li ber gora Pambuk Baba re derbaz dibe, ji ber xwe ve dibêje:
Gelo di nav Kurdan de jî kesên ji xeybê bizanin hene?
Dema Pambuk Baba van gotinên seh dike, lingê xwe bin axê
*) V.A.Gordlevskî, Karen Helbijartî, cilda yekem, rûpel: 400-401.
Ve çîroka han li Erzirume nivîsîye.
53
re derdixe, wî gavî ew mirov pê dihese ka şaşîtîyek çiqas me¬zin kirîye"*65'.
Cilda duyem a Berhemên Helbijartî yê Vladîmîr Aleksandrevîç Gordlevskî, li ser berhemên derbarên ziman û edebîya-ta Tirk hatine amade kirin*66). Ji ber ve yekê, tenê çar car navê Kurdan û çend carek jî navê bajarên wan tê de der¬baz bûne(Amed-Dîyarbekir carek û Cizîr jî carek). Di wî berh¬emê ku ji bo gotinên bi qîmet û yên pêşîyên Osmanîyan*) amade kirîye, V.A.Gordlevskî, car caran navê wan gelan jî tîne ku bi urf û adetên xwe ve nav Osmanîyan de cî girtine. Di wan nimunên Gordlevskî de derdikevin ku Osmanîyan bi yek çava li cîranên xwe nenêrîne , carên wisa hene di pendên di nav xelkê belavbûyî de bi rikoyî li wan rabûne. Wek tê gotin serbilindî û ji xwerazîbûna Kurdan ji her tiştî zêdetir wek gelekî çîyayî dîqqeta wan kêşaye. Yek di wan pendan de wiha têt

gotin:
"Wek Kûrde xwedîyê neh bizinan ewan jî dan", ji wî kesî re têt gotin ku destvekirî û merd e, ew wek wî Kurdî ye ku destê wî diçe wan neh bizinên wî jî bide. Gordlevskî dibêje: carên wisa hene di cîyê navên Kurdan de "Dayî Cezayir" bikartînin *), yanî dibêjin wek dayî* '' xwedîyê neh bizinan, ewan jî hemû dan.
Eynî bi vî awayî govend û şahîyên Kurdan dîqeta Os¬manîyan kaşa ye, pendek heye wiha dibêje:
(65) Cilda yekem, rûpel: 457.
*66) Binere: nota 4'an.
*) Mebesta wî Tirk in.
*68) V.A.Gordlevskî,, Karen Helbijartî, cilda duyem, rûpel: 272.
*) Daye, di cîyê gotina Tirkî dayî de hatîye, ku di mana xalo û mamo de ye. Di wextê Osmanîyan de dayi naznave fermanrewayen Cezayîre bû.
*7°) V.A.Gordlevskî, cilda duyem, rûpel: 272.
54
"Oereçî dibêje Kurd lê dixe"*70).
Lê wek Gordlevskî dibêje, car caran derbarê Kurdan de çîrokên wiha jî ber guhan dikevin:
"Kurd bi mijûlbûna savar kelandinê ve acizbûn, dawîyê di cîyê kevir bijartin û paqijkirina genimên ku bikelînin de, biryar didin bi yekcarî biçînin... dema ku savar ber na de diçin li ba qazî gazinên xwe jê re dikin, ew jî..."*71).
Di cildên din kara zanistî yên V.A.Gordlevskî de, cardin ge¬lek car navê Kurdan derbaz bûye, ez hêvîdar im ku di dîwarojan de em bikaribin bi vê beşê re di berhemekî serbixwe

de belav bikin.
*71) Cilda duyem, rûpel: 290.
55
MÎJARA PENCAN
LI SER KARAKTERA SERÎHILDANA
MEZIN A SALA 1925'AN
Serîhildana mezin a sala 1925'an a Kurdistanê Tirkîyê*)
yek ji wan xelekên bi xwînî yên herî mezin ên zincîra xebata
rizgarîxwazî-netewî ya Kurd e. Lê netewa me heta îro tiştekî
yekcar kem û heta derecek tiştên sethî di derbare rûpelên ge¬
lek hêja yên vê serîhildana mezin de dizane ku ji bo nîşandana
karaktera vê serîhildana ya rasteqînî û dîyarkirina wan dersên
dîrokî yên netewa me yê xebatker, pêwistî bi lêkolînekê
kûr û fireh heye. Qet nebe ji bo roja îroyîn ji me re alîkarî bikin
û em şaşîtîyên xwe yên do îro duçar nekin.
Li derveyê Kurdistanê jî heta îro bi awakî gelek kurt û heta
raddeyek bi aşkera ev serîhildana han şaş hatîye lêkolîn.
Beşekê gelek mezin ji dîroknivîsên bîyanîyan û bi rojhilatna¬
sên mezin en Sovyetê ve (ên wek Prof. ê bi nav û deng A. F.
Mîller) vê serîhildana han tevgerek kevneperest a destkirê
Ingilîzan danîne. Li gor wan, du armancên vê serîhildana yên
bingehîn hebûne; ya yekem, berfirehkirina manawra saha
v ' Ev maqale di hejmara duyem a kovara Rojî Kurdistan de hatîye
belavkirin (Bexdad, Tîrmeh, 1971, rûpel; 46-56)
56
sîyaseta sexte ya Ingilîzan ali ser bajarê Musilê ku li dijî Tirkan
dimeşandin û ya diduyan jî, goya kevneperestên hindur û
yên derve dixwestin di riya vê serîhildana re, pêşî li guherandinên

nû yên Kemalîstên*) şoreşger li Tirkîyê bigrin.
Yek ji wan sebebên herî mezin ên ku rû û cîyê rasteqînî yê karaktera serîhildana sala 1925'an di dîroknivîsên bîyanîyan de bi carekî ser û bin kirîye, ew alozî û têkilhevîyên bêhejmar ên karbidestên şoven ên Tirkîyê bûn ku ji bo cîbicî kirina hinek armancên xwe avêtin holê. Bi taybetî durustkirina wan xeber û belgeyên derew ên ku di dawîyê de bûn serokanîyên lêkolîna dîroka serîhildana. Nivîskarê ve gotara, di giftogûyekî xwe ya taybetî ya li gel rojhilatnasê mezin yê Sovyetî, Anatolî Fîlîpovîç Mîller de -ku wek me got di wê bawerîya de ye serîhildana sala 1925'an tevgerekî kevneperest e*)- ewî (A. F. Mîller) rast û rewan wiha got: "Ew materîyal û belgen di destê min de nin, riya wî qasî nadin ez bikarim bi awakî din li vê serîhildana binêrim, lê kengî belgên dîrokî yên bi bawer û saxlem bikevin destê min, wê çaxê helbet ez jî di bin wan ronîkirinan de dikarim bîr û rayekî nû bîriim û îtîrafê pê bikim ku ez şaş bûm." Ez di vê bawerîya de me ku piranîya dîrokni¬vîsên bîyanîyan jî her li ser vê raya ne.
Eva han, bêguman, wezîfekê yekcar mezin dixe ser milê dîroknivîs û heta hemû rewşenbîrên Kurdan, bi taybetî ewên ku di nêzîk ve agahdarîya wan li ser bûyerên vê serîhildana hene, hewil bidin karekî wisa bikin ku ew rastîyên dîrokî yên girîng ên ku peywendîyên wan bi serîhildana ve heye wenda nebin û kom bikin, bi awakî kûr û zanistî ya ji dûrê hissiyata,
* ' Ew tevgera mezin a netewa Tirk a ku piştî Sere Cihana ye Ye¬kem di bin serokatîya Mistefa Kemal de ji bo rizgarkirina welat berpa bû, di ware siyasî de jê re 'Tevgera Kemalî" û ji beşdaren we re jî "Kemalî" te gotin.

(2)
v ' Binere: A.F.Mîller, Kurtedîroka Tirkîye> bi zimanê Rusî, Mos¬kova, rûpel; 192-193.
A.F.Mîller, Li Ser Dîroka Tirkîyê Ya Nû, bi zimanê Rusî, Moskova-Lenîngrad, 1948, rûpel; 152-153.
57
bûyerê pê bikolin.
Nivîskarê vê gotara di daxilê quweta xwe de salan xwe yên xwendin û xebatên xwe yên li derveyê welat de, qîmeteke ge¬lek mezin da bi vê bûyerê, di teza xwe ya doxtorayê de cîyekî taybetî jê re amade kir ku ez dikarim bêjim bê netîce nema. Cara yekem pişti lêkolîna vê tezê ya destpêka sala 1963'an bû ku Enstîtuya Rojhilatnasî ya Akademîya Zanistî ya Sovyetê biryar da ku pêwist e ew şarezatîyen xwe "di bin ronahîya wan rastîyen ku di teze de nin, carek din bîr û rayen xwe yen di derbare serîhildana sala 1925'an a Kurdistanê Tirkîye de bin çav re derbaz bikin"^ '' Ji derveyê van, yek ji Kurdnasen herî mezin ê Sovyetê û rojhilatnasê otorite V.Vîlçewskî, bîr û raya xwe di derbarê vê tezê de nivîsand ku bi aşkera paş de gavavêtinên xwe ji şaşîtîyên xwe yên kevin ên ser bûyerê nivîsandibû, da xuyakirin, rastîyên wan netîcên ku di tezê de derbarê serîhildana 1925'an de hatine, qebul kir. Piştî vê, qasek şûn de, Dezga Rojhilatnasî ya Akademîya Zanistî ya
* ' Sureta we biryara ku li ser nave Serokatîya Enstîtuya Rojhilat¬nasîyê Akademîya Zanyarîyê Sovyete, alîkarvane serokê we dezge R.T.Exramovîç û Prof.B.M. Dautsîg imza kirine, li ba min heye. Piştî ve biryare, dema cara diduyan lekolînê ve teza han bi xwe de roja 15'e Gulana sala 1963'an beşa "Problemen Navnetewî" biryarek din

ya resmî derxist, ku di rûpela diduyan a ve biryare de di derbare Serîhildana sala 1925'an de wiha dibeje: "Beguman, yek ji rûye herî girîng ê têza Kemal Mezher eva han e ku li ser bingeha belgen bi qîmet şaşîtîya wan bîr û bawerîyen teng derxistîye. Di derbare ve serîhildana de, di nav me de belav bû ku goya hemû tevgeren Kurdî karekteren wan en giredanî hene û Ingilîzan ji bo armancen xwe yen Rojhilata Nêzîk berpa kirine. Nivîskarê ve teze, îspat kirîye ku ev serîhildanen Kurd, li dijî bindestîya metingehkarî (li Iraqe) û sîyaseta şovenî ya dewleta burjuwazîya nîvçe derebegî ya Tirkîyê, Iran û lraqe, bersîva civakî ya gele Kurdistanê bûne. Ew dîtina ku di derbarê karaktera Serîhildana Şex Seîd a sala 1925'an di nav me de belav bû, ku me digotev serîhildan bi deste Ingilîzan e; wexte muqayesekirina
li gel wan belgen ku nivîskarê di we teza xwe de anîne,
bi hindikayî pewiste rastkirineke kûr e".
58
Azerbeycan û Ermenîstana Sovyetê, ji ber amadekirina behseke taybetî di derbare vê serîhildana de, ji bo wê kiteba me¬ zin a ku di destê wan de ye, li ser dîroka gelemperî ya Kurd, bo belav bikin, ji nivîskarê ve gotara nivîsek xwestin. Vêca di vir de bi kurtî ez ê beşekê wê behse pêşkêş bikim. Hêvîya min ewe rojek bê ez bikarim hemû bi ser hev de belav bikim. Nivîskarê vê gotare xwe gelek bextîyar dizane eðer karîbe bi vî karî beşekê gelek kêm ji wî deynê mezin ê ku dayîka nîştîman xistîye ser milê her kurdekî, dabe.
* * *
Ne tenê ji bo dîyar kirina karaktera serîhildana sala 1925' an, ji bo hemû tevgerên azadî-netewî yên Kurdistanê Tirkîyê,

pêwîst e çavek li ser rewşa jîyana sîyasî, aborî û civakî ya vê beşa Kurdistanê ya salan berê Şerê Cîhana yê Yekem bê gerandin, da ku mirov bikaribe bi awakî durust û rewan hazên ku têkelê van serîhildanan bûne û tesîrê wan a li ser van serîhildanan derexe holê.

Wextê ku Şerê Yekem xelas bû û dawîyê Imparatorîya Osmanî hat, tevgereke sîyasî û kulturî ya mezin di seranserê Kurdistanê Bakûr de belav bû. Ew rêxistinên sîyasî yên ji ber sebebên şer xebatên xwe dabûn sekinandin carek din ketin nav qada xebatê. Ji derveyê van çend rêxistinên sîyasî, yên nû jî hatin damezirandin û çend rojname û kovarên Kurdî hatin weşandin. Hemû ev rêxistin û çapemenîyên han bi imkan û karinan xwe ve ketin hewildane ku bikaribin îstîfade ji rewşa sîyasî ya cîhana, bi taybetî ya Rojhilata Navîn werbigrin, da ku bikarin karekî wisa bikin, netewa Kurd jî bigihîje mafên xwe yên netewî. Her ji bo vê mebestê jî van rêxistinên han peywendî bi dewletên îtîlaf (dewletên sondxwarî) re girêdan.

Van bûyer û çalakîyên han tirsê xist dilê Tirkan ku Kurdistanê Bakûr jî wenda bikin, ji ber vê yekê carek din dest avêtin colandina hestê ayînî(!), ew çekên berê ku hatibûn bikar anîn. Lêbelê gava ku zanîn ev car netewa Kurd bi nêrîna daxwaza serxwebûnî rabûye, naçar bûn bi lez ji bo lêkolîna rewşa sîyasî ya Kurdistanê komîtekê taybetî bi beşdarîya çend wezîr û hinek jî ji Bedirxanîyan pekhatî damezrînin. Di netîcê de

59

komîte gihîşt wê bawerîya ku ger Tirkîye dixwaze Kurdistan jê cûda nebe, pêwist e di nav çarçova dewleta Tirkîyê de mafê Kurdan ê otonomîyê nas bike. Ji bo vê mebestê biryarekê tay-

betî derxist*), lê di pratîkê de ji bo cîbicîkirina vê qet tu tiş¬
tek nekir. Ji ber ku gelek di ser de neçû dijî Hukumeta Sultan û
dagirkerên bîyanîyan şoreşa rizgarî ya Kemalîstan destpê
kir. Eva han jî rewşeke sîyasî ya nû anî holê ku bi carekî seranserê
welat girt û li ser jîyana sîyasî û hemû dîwarojên nete¬
wa Kurd tesîrekê gelek mezin kir.
Şoreşa Kemalîstan beşekê mezin ji netewa Kurd coland ku bi
awakî dilsozane çû ji bo palpiştîya azadkirina welatê hevbeş
(mûşterek) ji destê dagirkerên biyanî*5). Kurd, bi hestekê niştimanî
ya gelek bilind û bi têgehîştinekê sîyasî ya rast rabû
pîyan. Lê di eynî wextî de beşek biçûk ji derebegên Kurdan,
palpişta xwe bi Ingilîzan ve girêdan û xwestin pêşîya berfirehbûnên
vê şoreşa bixitimînin. Ev rewşa han heta derecek
burjuvazîya netewî ya Tirk silikand. Li gel vê jî di nav berfirehbûnên
girîng ên pêvajoya şoreşa de derket holê ku Kurd, ji
bo şaxavêtinên naveroka guherînên şoreşgerî û ber bi pêş de birina
wan, di dîroka Tirkîyê de bûn unsurên pêşverû yên mezin.
Eva han, bû sebebê Mistefa Kemal û hevalên wî ku gelek bi
hêsanî di Kurdistanê de bi cî bin, gelek caran biçin nav Kurdan
û heta sala 1919'an, hinek civînên xwe yên sîyasî yên girîng di
nav wan de bidar bixin. Eva han tenê bi sera xwe belga wê ya
*) Binere: Dr. Blech Şîrkuh, El-Qezîye'l-Kurdîyye, Mazîyî'l-
Kurd we Haziruhum, Qahîre, 1930, rûpel; 65-67.
*) Hejmarek nivîskaren bîyanî behsa ve yeka han kirine ku be
alîkarîya netewa Kurd, Mustefa Kemal li hembere dijminên Tirkîye
nedikarî biser bikeve.
Di vî warî de diplomata Amerîkî W.Eagleton wiha dinivîse: "Ji
ber ku Atatûrk (Tirkan ji ber xoşewîstîya Mustefa Kemal nave wî ki¬

rin "Atatûrk", yanî babe Tirk-Nivîskar) di navbera salen 1920-1923'an de, di riya xebata yekîtîya Tirkîye de, nedikarî guh nede pişgirîya hezen Kurdan." W.Eagleton, The Kurdish Republic of 1946, London, 1963, rûpel; 12.

60

vekirî bû ku hazên demokratik ên Kurdan di wê bawerîya de bûn, bi serkevtina Kemalîstan, problema netewî ya Kurdan dê li ser riyeke rast çareser buya. Ji vê jî hin pêştir, hewl û xebata Kemalîstan ji bo nêzikayî ber bi Kurdan de û dayîna waad û sozan, bawerîyek wiha hîn zêdetir qewî dikir. Bi taybetî ji bo ku wan dizanî eva han dibe sebebê bahanek ji bo "sitendina" Kurdistanê Başûr ku di destpêka de li gel Ingilîzan ketibûn nav probleman. Her ji ber vê yekê jî, gelek caran wan, sozên ku didan Kurdan bi rîya belavokên taybetî ve dişandin navçan Kurdistanê Başûr. Yek ji wan belavokên de ku li Ararat û Colemêrge belav kirine û çend nusxên wê gehîştine Rewandizê jî wiha dibêje:

"Hevivelatîno! Hukûmeta Kotnara Tirkîye bi temamî aerardar e ku hemû peivistîyen şaristanîyete di welate xoşewîste me ye Kurdistanê Tirkîye de belav bike. Re û dirben we de ben aîr kirin. Gund û bajaren we de bedibistan û mamoste neminin, di jîyanekî gelek xweş de xezanen we de şad û bextîyar bin, asayiş û qanun de bibin sebebe peşveçûn û berfirehbûnen xer û xeraten rvelate we. Jîyan, mal û şerefa hevrvelatîyen me di bin parezgerîya rasteqînî û dilsozî ya aanunen komare de nin..." (6)

Ji derveyê vê, di germîya destpêka şoreşa burjuvazi ya Tirk de, hejmarekê gelek zade ji wan serokên ku bi Mistefa Kemal

re ve şoreşa han berpa kirin, herwekî di bîranîn û namên komkirî yên wan de jî dertê, Kurd bûn. Wek mîsal, Komita Serokatîya Kongra Erzirumê (23'ê Tîrmeh-6'ê Tebaxa 1919) -ku yek ji nuqtên herî girîng ên destpêka vê şoreşa têt hesêb ki¬rin*)" ji heşt kesan pêkhatibû, sise ji wan Kurd bûn. Ew her sê

*) Binere: A.M. Hamilton, Road through Kurdistan, London, 1937, rûpel; 295-296.

* ' Di wexte ve kongre de Mustefa Kemal slogana "xebata millet di dijî dagirkerên, di riya sencwebûnîya welat" de bilind kirîye.

61

kes ev in: Şex Fewzî* ', serokê terîqeta Neqşîbendîyan ji navça Erzîncanê; Sedullah Begê xelkê Sêrtê ku heta sala 1918'an en¬dama Parlamentoya Osmanîyan bû û serokê eşîreta Motkî*) Hacî Musa Begê Mîrzazade* . Mistefa Kemal li gel wan û gelek Kûrden din ên bi nav û deng peywendîyên gelek nêzîk danî û gelek namên taybetî ji wan re şand*11).

Di "Meclisa Netewî ya Mezin" a Tirkîyê de ku Kemalîstan di sala 1920'an de li bajarê Enqerê pêk anîn, 72 nûnerên Kurdan beşdar bûn* \ Hemû endamên vê meclisê gelek bi germî pêşwazîya axaftina nûnerê bajarê Erzirumê Hiseyîn Ewnî kirin ku di civînekê de wiha digot:

"Li ser ve kursîye mafe azaftina du netetuan heye: Kurd û Tirk". Axaftinên wek vê, çend carek ji alîyê nûnerên Tirkan ên wexte Kongra Stenbolê di derbarê lêkolîn û problema Musilê de hatine kirin*13).

Lê belê, Kemalîstan wek nûnerên çîna burjuwaya netewî ya desthilatdar, hîn cîyê pêyên xwe li ser desthilata qayîm ki-

* ' Bi nave Hacî Şex Fewzî Efendî bi nav û deng bû, di sala 1868'an

ji dayîka xwe bû, li Erzincan û Dersime xwedansoz bû û giranîya wî li ser civake hebû, dijî Taşnaqan rolek girîng lîst.

' ' Ev eşîra han li wilayeta Bedlîsê di nayçeke çîyayî ya nezîke serokanîyê rûbara Dîcle nişteçî ye, ji wan re "Mut yan jî Motkan" te gotin. Di dema Osmanîyan de Eşîra Motkî qet serî li ber hûkûmete netewandiye û hemû wexte jîyanek nîv-serxwebûyî domandiye.

*) Binere: Mustefa Kemal -Rîya Nû Ya Tirkîyê û "Name û Beyanen Komkirî yên Mustefa Kemal", çapa Rusi, cilda yekem, Moskova, 1929, rûpel; 65.

(11) Eynî serokanî, rûpel; 65, 81, 152, 228, 234, 236, 284, 312.

* ' A.R.Ghassemlou, Kurdistan and the Kurds, Prague, rûpel; 46.

(' Bi dirêjî di derbare ji bo xwe nezîkkirina ber bi Kurdan de hewlê Kemalîstan di destpêka tevgera xwe de, binere: Blech Şîrkuh, ser¬ okanîyê ku navê we derbaz bû, rûpel; 74-75 û her wiha A. Safrastian, Kurds and Kurdistan, London 1948, rûpel; 81-82.

62

rin nekirin, rûyê rasteqînî yê sîyaseta xwe ya netewî xistin holê ku eva han beşekê girîng ê sîyaseta giştî ya wan bû di dijî jîyana demokratik û çînen bindest de* \ Netîca vê sîyaseta han bû ku di milek de ketin tefandina gîyana karker û gundîyên Tirkîyê û di milek din de jî berê xwe dan netewên din, bi taybetî dijî Kurdan ku piştî Tirkan mezintirîn netewe bûn. Eva han mile tarî û kevneperest ê sîyaseta burjuwazîya netewî ya Tirk û bi tevayî eksê wê sîyaseta bû ku di destpêka bîstan de di xebata gelek qehremanî ya dijî emperyalîstên dagirker de hatibû ajotin. Piştî vê, di navbera çend salan de dijî hazên kevneperest ên nav xwe, ji bo cîbicîkirina van armancên xwe yên duru, pêwistîya Mustafa Kemal bi wê hebû ku hemû

desthilata di destê çîna burjuwazîya netewî de kom bike û di vê rîyê re jî dîktatorîya xwe damezrîne. Ji ber vê yekê di Tebaxa sala 1923'an de, partîyek taybetî durust kir û navê wê danî "Millet". Di helbijartina wê sala de ji 286 endamên par¬lamentoya, 265'ên wan ji vê partîyê da helbijartin*15). Eva han hîn zêdetir desthilat û îmkan da destê Mustefa Kemal ê nûnerê çîna burjuwazîya Tirk ku bikare sîyaseta xwe ya duru hîn zû biser bixe. Demek piştî vê helbijartina, Mustefa Kemal hin gavên pêş avêtin ku ji tevan girîngtir biryara rakirina

*) Beguman, yek ji wan şaşîtîyen mezin en ku li ser piranîya dîroknivîsên pêşkevtîxwaz ên derve tesîrê kirîye, ku di bîr û bawerîyen xwe yen di derbare Serîhildana Sala 1925'an de ber bi şaşîtîye de biçin eva han e ku bi yek çav û yek qalibe seyra sîyaseta Kemalîstan a li hemberê çîn û tebeqên bindest en Tirkîye û jîyana giştî a demokratik ya di welat de kirine û ferqek nexistine navbera van û sîyaseta wan a netewî ya di dijî Kurdan de, le ev herdu polîtîkayen bi hev ve giredayî di hîç wext û cîyek de cîhêkirina wan ji yekûdu nikare feyde bide ji bo derxistina rasteqînîye bi hole.

*) Binêre: A.D.Novîçev, Tirkîye, bi zimanê Rusî, Moskova 1965, rûpel; 167.

* ' Rejîma xelîfetîye, bi salan bû ku bibû mezintirîn asteng di pêşîya peşketina Tirkîye de.

63

xelîfetîyê bû* \ Dawîyê meha Çiriya Yekem a sala 1923'an rejima komarî (cumhuriyet) hat damezirandin, piştî vê di destpêka Adara sala din de xelîfe bi xêzanên wî ve ji welat hat dencistin û di meha Nîsanê de jî makeqanunek (qanuna esasî) nû ji bo welat danîn.

Rûyên tarî yên vê sîyaseta her bi zû, ne tenê dijî netewa Kurd, heta evê deyne cîyek, di pêşîya wê de di çend karekî sîyasî û civakî yên giring de xwe nîşan da. Burjuwazîya Tirk, bere ku li Kurdan xe li çîna karker xist. Herçend ku vê çîna han û serokên wê di yekem roja xebata Mustefa Kemal a dijî dagirkerên de, gelek bi dilsozane piştgirîya wan kirin jî. Ye¬ kemin gava Kemalîstan di vî warî de ew bû ku bi zû ji "Ittîhad" (mebest Îttîhat-Terakkî ye-Elîşêr) û "Pan-Islamî" yên kevin ji bo çîna karker partîyek taybetî dan durustkirin û heta navê wê jî danîn "Partîya Komûnist". Wek aşkera armanca ji vî ev bû ku bi vê rîyê hevsarê hemû proletaryaya Tirkîyê bikin destê çîna burjuwazî û wan ji rêxistina wan dûrxin. Kemalist ewqas bi lez bûn ku bi vê jî neman. Di Kanuna Duyem a sala 1921'an de, cendirmên bajarê Trabzonê 16 sero¬ kên çîna karker ên bi nav û deng kuştin ku yek ji wan Mustefa Subhî bû û bi salan dilsozane û bê tirs di riya azadîya Tirkîyê û bextiyarîya hemû netewa xwe de xebat kiribûn. Ev bûyerên han û bi dehan belgên dîrokî yên din van rasteqînîyan ji me re aşkera dikin ku sîyaseta netewî ya burjuwazîya Tirk tiştekê tîk û xwerî ya bi sera xwe nebû, ji ber ku perçekê girîng ji sîyaseta giştî ya kevneperestiyê bû. Dîyarkirin û dencistina holê ya rûyê rasteqînî yê vê sîyaseta, ji bo destnîşankirina çarçova rasteqînî ya karaktera serîhildana sala 1925'an, xwedî qîmetekê taybetî ye.

Bîr û bawerîya Kemalîstan a teng di wê de derket ku ne her tenê nekarîn yek ji wan erkên girîng ên şoreşa burjuwa-demokrat cîbicî bikin ku ew jî nehiştina bindestîya netewatî ye, heta ekse vê, bi tevayî rîyek dijê vê dan pêşîya xwe. Nîşanên

*) Bere ku Kemalist bi tevayî desthilata bigrin dest, naveroka sîyaseta şpvenî ya burjuwazîya Tirk, di wexte îmzakirina Peymana Sewr de derket, bi taybetî wan bendên ku peywendîya wan bi mesela 64
vê riya nelibar her zû derket* '. Nemaze wextê danîna makeqanûna nû ya Tirkîyê ya sala 1924'an.
Di makeqanuna nû de tenê wan bendên makeqanûna salen 1876 û 1909'an hiştin ku ew bend bi tevayî li gel berjewenda (menfeeta) çîna burjuwazî-netewî diguncan. Bi taybetî ew ên peywendîya wan bi bêparkirina mafên rewa yên sîyasî yên çîn û netewên bindest re hebûn (wek bêparkirina mafên dengdane ji bo ew kesên ku nikarin bi Tirkî bixwînin û binivîsin û di seranserê welat de danîna zimanê Tirkî wek zimanê resmî yê tîk û tenê). Ev sîyaseta han berê serîhildana sala 1925'an di ge¬lek kirinên din de xwe nîşan da û gelek bi zû gihîşt dereca sîyaseteke şovenî ku armanca wê, wek nivîska-rê Ingiliz F.Rynd dibêje, eva han bû: "Tirkîyê bike dewleteke yeknetewî"*). Ji bo cîbicîkirina vê jî aşkera ye pêwîst bû kuhemû netewên din ên di vî welatî de, di nav netewa mezin de asîmîle bikin (bihelînin).
Hêdî hêdî rêçên dizî yên ve sîyaseta derketin meydana, heta di wan belavokên ku Kemalîstan di Kurdistanê de belav dikirin de jî, wek me dît, bi aşkera armanca wan qezenckirina Kurdan bû, her di wan deman de jî pencên êrîşê birin li ser wan Kurdan ku bi tu awayî bawerîya wan bi danîna dan û sitendinê bi Tirkîyê re tûne bû. Dawîyê we belavoka ku me di pêş de behs kir, bi vî awayî hatîye:
"Ew en ku dijî qanûna kamara me serîhildin, gelek bi tundî û

be merhemet de ben ceza kirin, hemû hezvlekî serîhildana be ku je re firseta hîç cure serkevtinek bidest bixe be dan, de ben perçiqandin"^19K

Wek Mamoste Şeweys di nivîsandinên xwe de daye xuyakirin her di wan deman de, Kemalîstan nehiştin ku Kurdan Kurd ve hebû, tirseka mezin a behesab xistibû dile wan. Ji ber ku, cîbicî kirina van bendan dihat mana tecrîdbûna bazirganen burjuwazîyen Tirk ji bazaren Kurdistanê Bakûr.

*18) F.F. Rynd, 'Turkish racial theories", Jounal of the Royal Cen¬ tral Asian Society, Vol. XXI, July 1934, Part II.

*19) Binere: A.M. Hamilton, OP.Cit, p.296.

65

Tirkîye nûnerên xwe bînin "Kongra Netewên Rojhilat" a ku di sala 1920'an de li Baku çêbû, beşdarî bikin. Kemalîstan xwestin ew bi xwe li ser navê Kurdan heyetek teşkil bikin û bînin vê kongre* \ Ji ber ku, wisa dîyar e tirsa wan ew bûye: welatparezên Kurd mesela gelê xwe di riya vê kongra cîhanî re wisa bînin pêş ku li gel sîyaseta wan negunce. Her di wê salî de Kemalîstan biryara dardakirina Kamuran Alî Bedirxan dan ku sed salek bû malbata wî bê rawestandin di riya rizgarîya Kurdistanê de xebat dikir. Qasek şûn de, Zîya Gökalp ku yek feylesofa neteweperest ê herî mezin ê Tirkîyê têt hesêb kirin*21), di rojnamekê de ku li bajarê Dîyarbekrê derdiket, derbarê Dîyarbekir, danişîiwanên wê û heta danişîwanên hemû bajarên Kurdistanê Bakûr, goya ku Tirk in, çend gotar belav kir* \ Ev cure nivîsandinên han, bi taybetî hestê rewşenbîrên xwîngerm û pata agirê hîsa netewî ya birîndar a wan geş dikir.

Di milek din de sîyaseta şovenî ya Kemalîstan hemû rêxistin
û rojnamên Kurdan naçar kirin ku yan bi tevayî dest ji kar
berdin yan jî bikevin saha xebata binerd, piştê van kirinan jî
karbidestên Tirkîyê bi xwe bi awakî resmî ew qedexe kirin. Di
* ' Binere: Rojî Nwe, hejmar 1, sal; 2, Adara 1961'an, rûpel; 21.
*21) Ziya Gökalp (1876-1924), xelke Dîyarbekrê bû, bi nijada xwe
Kurd e, le ji hemû Tûranîyan Tûranîtir bûye. Ji ber ve yeke le nexweş
hatîye ku jê re Kurd bêjin. Hinek kesen ku dije wî ne dibêjin ew ne Tirk
e, le ji hemû kesî zêdetir di rîya Tirkayetîyê de çûye. Ewî di dijî wan
kesan de bi navê "ji bo wî mirovî ku ji min re dibêje Tirk nîne" helbestek
nivîsandîye û wiha dibêje:
Ez Tirk bim an ne
Hevreyê Tirk im.
Hun p Tirk bin an ne
Dijmine Tirk in.
'^) Binêre: Turkich Nationalism and Western Civlization selected
essays of Zia Kokalp, translated and edited by Niyazi Berkes, London
1959, pp. 43-45, 140-141.
66
sala 1924'an şûn de karbidestên Tirk ên li Kurdistanê bi aşkera
dest bi faalîyetê kirin û ji xelkê xwestin ku di cîyê kar û bar û
axaftinên xwe yên rojane de zimanê Tirkî bikar bînin, di eynî
sala de hejmarek ji serokên Kurdan ji welat dûr xistin*2).
Ev û wek van bi dehan bûyerên din bi carekî hestê netewî ya
hemû çîn û tebeqên netewa Kurd xist nav bizavekî û eva han jî
tesîrekê gelek mezin li ser jîyana sîyasî ya Kurdistanê Tirkî¬
yê kir. Di vir de gelek pêwîst û girîng e em ve rastîya han bêxin
li ber çavan ku ev beşa han a Kurdistanê, landika durustbûn

û geşkirina bîr û bawerîya netewî û melbenda destpêkî ya peydabûna tevgera azadî-netewî ya hemû gelê Kurd e* \ Ji ber vê yeke ye ku sîyaseta şovenî ya çîna karbidestên Tirkî-yê gelek bi zû gîyana xelkê coland û piranîya wan di pêvajoya xebata gelek salan dirêj ên bab û bapîrên xwe de zêdetir xwedî tecrûbe bûn. Eva han rastîyek dîrokî ya herî mezin e ku tesîrekê gelek zade li ser berpabûn û karaktera serîhildana sala 1925'an kirîye. Lêbelê gelek mixabin piranîya dîroknivîsên vê yekê pişтguh kirine.

Li gel vê jî, sîyaseta şovenî ya Kemalîstan a li hemberê Kur¬ dan bala hinek dîroknivîsên bîyanî yen dûrbîn berê berpabûna serîhildana sala 1925'an, kaşa ye û gotine; ku ev sîyaseta han di netîcê de dê Kurdan ji bo serîhildanek mecbur bike.

Di vî warî de cî û qîmetekê gelek girîng ê bîr û bawerîya dîroknivîsê Ingiliz ê bi nav û deng Prof.Arnold Toynbee heye. Toynbee, du sal berê serîhildana çûye Tirkîyê û gelek bi nêz de peyvendî li gel karbidestên mezin û mirovên sîyasî yên nas¬ kirî yên vî welatî re danîye. Piştî vegera xwe, di gotarek xwe

*23) Binere: L.Rambout, Les Kurdes et le droit, Paris, 1947, p.26.

* ' Piranîya tevgeren gele Kurd di sedsala 19'an de di ve beşa Kur¬ distanê de berpa bûn. Yekem car di sala 1880'an de, her di ve beşa Kurdistanê de slogana serxwebûna Kurdistanek mezin, di wexte serîhildana Şex Ubeydullah de hatîye avetin. Cardin Kûrden welatparez ên ve beşa han a Kurdistanê bûn ku yekem rajname bi zimanê Kurdî derxistin û di dîroka Kurdistanê ya giştî de yekemin rexistina sîyasî damezrandin.

de behs kirîye ku çawan li wir "hewil didin Kurdan asîmîle

bikin" û gihîştîye wê netîcê ku ev sîyaseta han rojek ji rojan "ji alîyê Kurdan de dê bibe sebebê serêşî û nexweşîyê ji bo Enqerê, bi rada wê serêşî û nexweşîyê ku ji alîye Arnawudan de di wextê xwe de ji bo Imparatorîya Osmanî çêbû*). Ez wisa dizanim ku Mistefa Kemal û hevalên wî dê zêdetir feyde bibinin eðer her di destpêkî de pêşîya bûyerek wiha bigrin û ji bo vê yekê mafê hewvelatî yê wekhevîyê bidin Kurdan, lê ewan bi zanîn be yan na, sîyaseta asimilasyona ji bo xwe bijartine"* 26).

Tenê hestê netewî û sîyaseta şovenî ya Kemalîstan pal nedan Kurdan ku serî hildin, ji ber ku gelek sebebên din jî di holê de bûn ku piranîya wan jî her netîca vê sîyaseta han bû. Berê hemû tiştî pêwist e ku em çavek di rewşa jîyana aborî ya nû ya Kurdistanê Tirkîyê ya piştî serkevtina şoreşa burjuwazî ya ku di welat de çêbû, bigerînin, da ku em bikaribin wan sebebên aborî yên girîng ku di vê beşa Kurdistanê de rewşa teqîna sîyasî bi carekê gîhande dereca kemalbûnê dest nîşanbikin. Aşkera ye ku li Tirkîyê li gel serkevtina şoreşa burjuwazî, sîyaseteke aborî ya nû hat holê. Kemalîstan, ji bo mebesta lawazkirina çîna derebeg û cure berhemên derebegî, çi di warê zîraet (kist û kal) û çi jî di warê pîşesazî (sanayi) û bazirganî de, ji bo pêşdebirina peywendîyen berhemen sermayedarî, çend gavên pêş avêtin. Lêbelê, berê her tiştî armanca wan

(") Di salan bîstî û sî yen sedsala 15'an de, Tirken Osmanî hemû welatê Arnawudan (Albanya) îşxal kirin. Her wî wextî gele Arnawud bi germî ket xebata dijî van dagirkerên bîyanî û bi dehan serîhildanên bi xwînî berpa kir. Ji ber vê yeke, gelek caran têt gotin, Arnawudan ji hemû milan zêdetir sereşîye ji Osmanîyan re derxistine.

Wek mîsal, serîhildana Arnawudan a sala 1911-an, heta derecek bûye sebebek gelek mezin ji bo jarbûna rejîma Tirkên Ciwan (Jön Tûrk).

*) Professor Arnold J. Toynbee, "Angora and the British Empire in the East", The Contemporary Review, London, June 1923, pp.386-387.

68

hemû gavavêtinan, bi hêzkirina sîyasî û aborî ya çîna burjuwaya xwe bû. Ji ber vê yekê, di netîcê de, ne tenê bara jîyana çîna bindest ber bi başbûnê de neçû, di gelek milan de ber bi xirabûnê de çû.

Kemalîstan, nedixwestin di binî de li derebegîyê bixin û bi vê yeke cotkaran rizgar bikin. Ji ber vê, berê hewil û bizava xwe dabûn wê ku awayê berhemanîna derebegî gavek pêş de bibin û şiklê sermayedarîyê bidine. Wek têt zanîn eva han jî di hemû cî û wextan de dibe sebebê hîn zêdetir perçiqandina cotkar û heta hemû gundîyan. Her di netîca vê sîyaseta bû ku heta demek piştî serkevtina şoreşa burjuwa, hinek serane û bacan derebegî her wek xwe hiştin, heta Kemalîstan gelek ca¬ ran jî destê alîkarîya ji bo kesên xwedî ax ên ku peywendîyên wan pê re hebûn, dirêj kirin. Mesela krêdî dan wan û ji der ve traktör û wasitên berhemê yên nû ji bo wan anîn. Bi taybetî li ser hesaba cotkaran Ermeni û Yunanîyan, mal û axên van cure xwedî milkan pêş de diçû. Hejmara cotkaran bê ax jî, nemaze di navçan wek Kurdistanê de ber bi zêdebûne de bû. Heta Ismet Inönû yê serokwezîrê sala 1936'an, bi xwe naçar bû eva han qebul bike ku "hejmarekê bêhesab cotkaran bê ax hene"* '. Bîst û çar sal piştî vê, rojnama "Yenî Sabah" a Tirkî wiha nivî¬ sandîye: "Gotinên Şêx ji bo cotkaran wek qanûn in, heta mafê

wan nîne bê rizayê wî qet bi tu awakî alîkarîyek bidin karbi¬
destên mîrî"*28). Evên han hemû vê rastîyê dikin ber çav ku
bi vî awayî sîyaseta zîraetê ya burjuwazîya Tirk, sîyasetekê
rast û serkevtî nebû. Ji ber vê yekê, bû sebebê berfirehbûna
dijîtîya çînîtî û civakî di gundên de* '.
(27)
v ' Binere: Dîroka Hemû Cîhane, bi zimanê Rusî, cild 9, Moskova
1962, rûpel; 441.
*28) Ji Kovara El-Terîq, Beyrut, 8'e Tîrmeha sala 1961, rûpel; 93'an
hatîye sitendin.
(29)
v ' Piranîya dîroknivîsên peşverû, îşaretê ve xala han a girîng ki¬
rine (wek mîsal binêre; P.P. Mayesief û M.A. Hasretyan, Tirkîye, bi
zimanê Rusî, Moskova, 1965, rûpel; 65).
69
Aşkera ye ku bi vê rîyê nedikarî karek wisa bike, da ku
zîraet di Tirkîyê Kemalîstan de gavên mezin ên ber bi pêş de
bavêje. Wek mîsal, di sala 1929'an de, cihen ew milk û axên ku
ji bo zîraet dihatin bikaranîn, gihîşt sewîya salan berî Şerê
Cîhana yê Yekem, lê ew berhemên ku jê dihatin hilanîn li dor
û berê ji sedî 80'yî (%80) berhemên berê serî derbaz nedibû.
Hejmara heywanan jî her di wî salî de gelek bi zehmetî xwe
digîhand ji sedî 85'î hejmara berê şerê* . Di netîca van de giranî
gelek pêş de diçû. Ez di wê qeneetê de me ku ev hejmarên
han gelek bi aşkera dereca wan giranîyan dixin li ber çav: Di
sala 1913'an de, hoqeyek goşt 5 quruş bû, hoqeyek nan quruşek û
rûnê zeytûnê 3 quruş , lê di sala 1928'an de, bihayê hoqeyek
goşt gihîşt 150 quruş, nan 18 û rûnê zeytûnê 70 quruşan. Bi vî

awayî dewra Kemalîstan bihayên pêwistîyên bingehîn li gor berê şerê ji 18 û heta 40 caran zade bûn*31). Gruba ku feydê ji vê giranîyê girt tenê burjuwazîya bazirganî ya Tirk bû ku hejma¬rek dîroknivîs, vana hazê pêşeng a şoreşa Kemalîstan dihesibînin, lebelê ji hejar û bindestan re tenê tiştek hebû: Birçîtî!

Heta piştî hatina Kemalîstan, ew pêşketinen ku di warê berhemên pîşesazîyê (sanayî) de çêbûn, di welat de nebûn sebebê başbûna rewşa jîyana aborî . Eqsê vê, bihêzbûna desthi¬lata sîyasî û aborî ya burjuwazî, bûn sebebê zade mêjandin û perçiqandina çîna karker. Roja karkerekî şareza (kalifiye) li bajarê Stenbolê digihîşt 120-200 quruşan û yê karkerek normal

*) Binêre: A.Noviçev, serokanîyê ku bere navê we derbaz bû, rûpel; 170.

*) Di derbare van hejmarên de binere; The Times, London, July 8, 1929, ewî dîqqet dikişe ev e ku heta karbidestên Tirkîye her çend hewil didan jê kem bikin, le bi xwe jî bi awakî resmî îtîrafe bi ve gi¬ranîyê kirine. Serokanîyên resmî yen wan rojan wiha dibêjin; bihayê eşyan ên sala 1929'an, ji 13 heta 15 caran bi nisbet sala 1914'an zêde¬tir bûn (binêre: R.P. Korniyevko, Tevgera Karkeran Li Tirkîyê, 1918-1963, bi zimanê Rusî, Moskova, 1965, rûpel; 57).

*) Binere: R.P.Korniyevko, serokanîyê ku navê we derbaz bû, rûpel; 57.

70

jî li dor û berê 40 heta 100 quruşan bû* \ Her çendîn rojên kar gelek caran digihîştin 16 seetan. Mîqdara wan rojaneyên han wek ku serokanîyên resmî jî gotine, di rasteqînîya xwe de sedî 17 ji rojaneyên karkerên sala 1913'an kêmtir bûn* \

Rojaneyek wiha kêm tenê tara jîyana ziktêrîyê nedikir, wek

mîsal, di serokanîyek bawerîpekirî de dibêje ku karkerên madenên komirê yên Zonguldaxê, ji nanê tisî û genimên şamî pê ve qet tiştek din nedixwarin* \
Li gel hatina Kemalîstan, mil bi milê tadaya aborî, tadaya sîyasî jî li ser çîna karker zade bû. Hîn serneketibûn ku bi te¬ vayî dijmin ji welat derînin, bi awakî hov ketin gîyana çîna karker û rêxistinên wê (tenê di payîza sala 1922'an de, zêdetir ji 300 serokên vê çîna karker şandin bendbcanan)* 5\ Kemalîs¬ tan, ber bi girtina rêxistinên karkerên re, eynî wextî rêxistinên bi xwe ve girêdayî dadimezrandin da ku bi vî awayî nehêlin tevgera karkerên berfireh be û bikeve qalibek yekgirtî.
Hemû çîn û tebeqên bindest ên Tirkîyê bê ferqîtîya netewî, bi carek ji destê vê sîyaseta nalebar a karbidestên burjuwazîya Tirkîyê de kerixîbûn. Eva han jî her bi zû berê serîhildana sala 1925'an, xwe wek zincîra tevgerek grevan de xist pêş.
Wek mîsal, gundîyên hinek navçan rojavayê Tirkîyê sala 1923'an de, serîhildanek mezin dijî hûkûmet û derebegîyê berpa kirin û gelek karbidest û cendirme kuştin. Lê gelek bi tundî û bêmerhemetî vê serîhildana tefandin û di meha Çirîya Ye¬ kem a eynê sala de qanunekê "dijê çetegirî"*) yê dendstin ku
(33)
v ' Binêre; A.Noviçev, serokanîyê ku navê we derbaz bû, rûpel; 173.
*) 'Yekîtîya Meslekên Navnetewî", bi zimanê Rusî, cild: 3, Moskova-Leningrad 1926, rûpel; 42-43.
* ' Binere; R.P.Korniyenko, serokanîyê ku navê we derbaz bû, rûpel; 42-43.
*) Kemalîstan ne tene serîhildanên Kurdan bi "çetegirî" bi nav

kirine, ji ber ku çi tevgera dijî xwe bihesibandina, bi wî navî bi nav dikirin.

71

armanca wê ya bingehîn ji bo berxwedaneke hemû cure tevgerên gundîyan terxan kiribû* '. Di wî wextî de nerazîbûn û sevîya tevgera karkerên gihîştibû qonaxek pêş. Tenê di havîna sala 1923'an de, pirtir ji 12 hezar karkerên madenen komire ên Zonguldaxê, sê caran grev kirin* \ Gelek grevên din ên bi vî awayî, li Stenbolê û bajarên mezin ên Tirkîyê çêbûn. Pêwist e em diqetê bikişînin li ser vê xala han jî ku nûnerên hemû netewen din ên Tirkîyê beşdarîya van cure tevgeran kirin.

Bi vî awayî em dibînin ku piştî hatina Kemalîstan nerazîyeke giştî di hemû Tirkîyê de hebû, aşkera ye ku gelê Kurd ne ji derveyê vê bû. Lêbelê, çend sebebên taybetî di holê de bûn û evan tesîrek wisa kiribûn ku ev nerazîbûnên han di Kurdistanê de zêdetir netîcên tund û ruj bidin. Carek berê hemû tiştî, sîyaseta aborî ya Kemalîstan di Kurdistanê de, li ser hemû tiştên re rîyek şovenî ya tund dabû li ber xwe. Wek mîsal, Kemalîstan navçan Tirkên de heta derecek gelek zade, desthilata sîyasî ji xwedîyê axên mezin sitendin. Em dibînin di Kurdistanê de hewil didin ji derveyê vê, li berjewendîya wan a aborî jî bixin. Bi taybetî yên wan axa û serokeşîrên ku berê têkelê rêzên tevgera azadî-netewî bibûn. Pêwist e em eva han jî bêjin, ku mebesta vê lêdanê azadkirin û bi vê cura rakêşana gundîyen Kurdan ber bi xwe ve nebû, ji ber ku eva han beşek ji sîyaseta şovenî ya Kemalîstan bû. Wek mîsal, beşek ji baştirîn milk û axa Kurdistanê ji xwedîyên wan zeftkirin û

dan deste wan Tirkên ku ji Yunanîstanê anîn*3 '. Tenê di sala 1931'an de, biryar dan ku 100 hezar Tirkên Bulgaristan û Yugoslavyayê bînin, li hinek navçan Kurdistanê bicî bikin. Goya armanc ji vê "ji bo bihezkirina nişteclyen xwe yen Tirk"^0' bû.

* ' P.P.Mayasiev, Di Wê Serdema de Peywendîyên Ziraetê Li Tirkîye, bi zimanê Rusî, Moskova, 1960, rûpel; 171-172.

*) Binêre: A.Korniyevko, serokanîyê ku navê we derbaz bû, rûpel; 59.

*) Binere: Problemen Ziraetê, bi zimanê Rusî, cild; 1-2, Moskova, 1936, rûpel; 127.

*40) Binere: The Times, August 27, 1931.

72

Aşkera ye ku ev sîyaseta han ne tene bû sebebê nerazîbûna gundîyên Kurd, bi wan re bû sebebê nerehetîya kesên serdestên wan jî.

Sebebek din a taybetî di hole de bû ku tesîrê kiribû li ser beşekê gelek zade ye danişîiwanên Kurdistanê, bi taybetî eşîrên nîvçe koçer û bazirgan. Di sedsala 19'an de, seretaya durustbûna bazarek yekgirtî di hemû Kurdistanê de destpe ki¬ribû, ev vî karî han a girîng, di netîca vebûna bazara Kurdis¬tanê ber bi bazara sermayedar! ya cîhana û destpe kirina rizgarbûn ji çarçova awayê berhemanîna girtî (tebîî), roj bi roj ber bi firehbûnê de bû. Parvekirina Kurdistanê di navbera Tirkîyê û Irana de, di wê serdema de hîn di pêşîya van pêşveçûnan de nebibû astengek . Di wan salan de di navbera Kurdistanê Bakûr û Başûr de dan û sitendina bazirganî, noqta rûbara Xaburê ya ku bi Dîclê ve dihat girêdan û karwanên herdu mi¬lên de diçûn û dihatin, van herdu milên Kurdistanê bi hev ve

gire didan, ji derveyê van ew heft riyan ku di wê dola de 20 km. bera wan bû, evên han heta derecek ber bi pêşdeçûnê de bûn. Heta dema nerehetîya navbera Ingiliz û Tirkên a li ser Kurdistanê Başûr, Tirk gelek hars bûn ku peywendîya bazir¬ ganî di navbera vê beşê Kurdistanê û Kurdistanê Bakûr de ge¬ lek xurt e û wek belge jî behsa wan heft rê û dolan li ba Xaburê kirin*). Ji derveyê vê, ev peywendîya aborî bû ku di nezdê wê komisyona taybetî ya "Komela Gelan" ji bo lêkolîna wê problemê şandibû û di rapora xwe de dawa kiribû ku eðer "Wilayeta Musilê" ji lraqê re bê dan, pêwist e riya xelkê bide da ku bi serbesti li gel Tirkîyê û Surîyê bazirganîya xvye bikin û ev mafê han jî ji bazirganên Kurdistanê Tirkîyê re bê dan ku riya Wilayeta Musilê ji bo dan û sitendinên bazirganî bikar bînin*42).

*) Binêre: League of Nations-Çniestion of the frontier between Turkey and Iraq. Report submitted to the Council by the Commission instituted by the Council Resolution of the September 30 th, 1924, p. 29.

(42)lbid,p.90.

73

Lêbelê, rewşa nû ya dawîyê xelasîya Şerê Cîhana yê Yekem û bi dereca yekem bi destê Ingilîzan dagirkirina Kurdistanê Başûr û cihebûna wê ji Kurdistanê Bakûr, li gel serkevtina çîna burjuwazî li Tirkîyê û Irana, vê mana han dibexşîne ku êdî Kurdistan bi awakî polîtîk hat çend perçe kirin ku ji bo vê mebesta han gelek xebat hat kirin da ku bi vî awayî perçekirî be. Eva han jî, bêguman, li ser jîyana aborî ya Kurdistanê tesîrekê yekcarî mezin kir û bi taybetî li ser peşdaçûna prosesa

bazareke yekgirtî ya ku li ber çêbûnê bû.
Tirkên dixwestin bi carek dest deynin li ser hemû Kurdistanê, lê gava zanîn ku nikarin Kurdistanê Başûr bixin bin bandorîya xwe, di sala 1924'an de destavêtin ku bi wasita eskerî hemû rê û buwarên sinorên li gel Surîyê û bi taybetî li gel Iraqê bibirin*). Bi vî awayî bi rakirina rîya bazirganîya navbera van herdu beşên Kurdistanê, zehmetkirina peywendîya navbera wan, ne tenê bazirganên herdu milan, di netîcê de herdu bazaran jî gelek zerar dîtin. Heta nûnerên Iraqê, di yekem civîna komita duqolî ya çavdêrîya sinore navbera Tirkîyê û Iraqe de ku di dawîyê sala 1926'an li Zaxoyê hat çêkirin, bi taybetî dîqeta heyeta Tirkên li ser vê problema aborî kaşan (44)
Bi zorî ji hev cihêkirina Kurdistanê Bakûr û Başûr , li ser jîyana aborî ya eşîrên nîvçe koçer jî tesîrek mezin kir. Karbidestên Tirkîyê, bi carek de hatin-çûna wan eşîrên a havîn û zivistanan li cîwarên ku ketibûn ser axên van herdu beşên Kurdistanê, qedexe kirin. Di neöca vê de, bi hezaran serî mî û bizinan van eşîrên têk çûn. Wek mîsal, tenê havîna sala 1927'an, dor û bera şeş hezar kes ji Eşîra Ertûşî û Sindî, di netîca wan

*) Binêre; A.Safrastian, Kurds and Kurdistan, pp . 87-88.
* ' Binêre: Report by Britannic Majestys Government to the Conucil of the League of Nations on the administration of Iraq for the year 1926", London, 1927, p.21.

74

qutkirina ji cîwarên wan, zerarek gelek mezin dîtin*). Nêzîkê du sal berê wan jî, dor û bera 1200 xêzanên (aîlên) Eşîra Mîran naçar bûn ku bi yekcarî Kurdistanê Tirkîyê bicî bihêlin

li Kurdistanê Başûr, li qeraxên rûbara Dîclê bicîbin*). Aşke¬
ra ye di netîca van kirinan de, nîvçe koçerên Kurdistanê jî bi
tevayî dijî karbidestên nû yên Tirkîyê dildax û tijî bûn.
Ev nîvçe koçerên han li gel hemû gundîyen din ên Kurdista¬
nê, herwiha karker û feqîrên nav bajarên, hemû çîn û tebeqên
bindest ên Tirkîyê, fîxan dikilin ji destê van bac û seranên nû
yên ku bi yekcarî ew xistibûn nav tengasî û zehmetîyan. Heta
ew sermîyanên ku di deste zeneetkar û bazirganên navîn de
kom bibû, têr nedikir da ku bikaribin li gel rebaza sermayedarîya
nû ya Tirkîye xwe pêş bixin. Tesîrê van bac û seranan ji
tevan zêdetir li ser gundîyan çêbû, ji ber ku di dema Os¬
manîyan de piranîya wan gelek caran bi salan dikarin xwe ji
van baran biveşêrin. Wek mîsal, di sala 1913'an de, malbatek
derebeg a navça Bedlîsê, bîst salan zêdetir ser de derbaz bû ku
pulek bac û seranên dewleta nedabû*). Lêbelê, di dema dest¬
hilata merkezî ya burjuwazî de, aşkera ye ku imkana tiştên
wiha bi carek hat birîn. Kovara "Rojhilata Nêzîk û Hindis¬
tan" ya Ingilîzî, çend meh piştî serîhildana sala 1925'an, di
derbare vê mesele de wiha dinivîse: "Wezareta Darayî (Ma¬
lîye) qet tu riyek nehiştîye ku daniştirvanen Tirkîye bi we
zvasite bikarin xwe ji dana bac û seranan rizgar bikin"'48'. Li
ber vê re her ku diçû ew bac û serane ber bi zêdebûnê de bûn.
Wek mîsal, tenê di navbera salek de (1928-1929) hatinên dew-

* ' Binêre: League of Nations. Report by Britannic Majestys Gov¬
ernment to the Council of the League of Nations of the administration
of Iraq for the year 1927, London, 1928, p.26.

(46) Binêre: Report.... for the year 1926, p.16.

*47) Binere: A.Safrastian, Kurds and Kurdistan, pp.72-73.

*48) Binêre: The Near East and India, Vol. XXVIII, November 19, 1925, p. 612.

75

letê yên ji bac û seranan ji sedî 6 zêdetir bû*49). Di sala 1938-1939'an de, baca raste rast (mibaşir) gihîşt dereceke wisa ku pênc cara sala 1930-1931'an bû*50).

Heta baran serane û bacan jî li gor navçan din, li Kurdistanê zêdetir bû, hemû tiştên em deynin milek, tenê ew beşê gelek zade yê ordîya dewleta ku vir ser pişta xelkê dijîya em bidin ber çav, wî çaxî netîca wê rewşa ji me re hîn ronîtir dibe. Ebdulezîz Yamulkî di vî warî de nivîsandîye, wiha dibêje:

"Ordîya Tirk, li ser mile gundîyen Kurdistanê belakî mezin bû, gundîyen Kurdistanê naçar bûn zexîre ji bo wan kom bikin, bi pişta xwe bigihînin qişle û qereqolan. Li wir jî ewan li gora dile xwe bihaye pe didan û her ewqas ji wan re dihîştin ku bikarin zivistana xwe bi nan û berû, bi zike birçî bibin serî"* .

Vê sîyaseta han, bi carekê xelkê ji taqet xistibû. Beşek ji rêxistinen sîyasî yên Kurdistanê bi awakî vekirî bi vê yekê hesîya bûn, wek "Komita Erzirumê", ya ku di wextê serîhildana sala 1925'an belavokek taybetî belav kirîye û tê de hukmê rakirina bac û seranan daye* '.

Piştî serkevtina şoreşa burjuvazi li Tirkîyê, bi gelemperî rewşa jîyana aborî û civakî ya Kurdistanê Bakur ev bû, her bi van pêlen fireh ên hîle û astengan ve mirov bi rehetî dikare sebebe bingehîn û rewşa hazên sîyasî yên hemû tevgerên azadî-netewî yên Kurdistanê Tirkîyê ya dawîyê Şerê Cîhana yê Yekem, sebebê serîhildana mezin a sala 1925'an bide dîyar kirin.

*49) Binere: The Near East and India, Vol. XXXIV, August 9, 1929, p.178.
(i>u) Dîroka Hemû Cîhan, bi zimanê Rusî, Cild-9, rûpel; 445.
*51) Ebdulezîz Yamulkî, Kurdistan ve Kûrt Ihtilalleri, cild:l, Tehran, 1946, rûpel; 78.
*) Binêre: A.Ghassemlou, Kurdistan and the Kurds, p. 50.
76
Wek me bi aşkera dît ev sebebên han, di nav civakek de, bi piranî di rewşen serkevtina şoreşên burjuwazî-netewî de du¬rust bûn, ev sebebên han jî ne tenê di Kurdistanê de, belko di wê serdema de li hemû cî û demek de bes bûn ji bo wê netewa bigihîne dereca teqînê. Gelek aşkera ye di rewşen wiha de, herçiqas sebebên derve jî di holê de bin, lê di zanyarîyê dîroka de ji derveyî rolek biçûk pê ve ji van re qîmetek nehatîye dan, qet tu wextê rast nîne û mirov nikare wek ku gelek dîroknivîsên kirine, vê yeke hazê colînerê bingehîn a serîhil¬dana sala 1925'an nîşan bike.
77
MÎJARA ŞEŞAN
KOMELA GELAN (CEMIYETI 'EKWAM)
ÛKURD
Çend gotin li ser siyasete**)
Her çendîn beşekê zade vê gotara min ji bo behsa damezrandina Komela Gelan û karaktere vê dezgê hatîye amade kirin, lê ev yeka han dikare alîkarîya me bike ku em baştir bikarin helwêstê komelê li hemberê gelê Kurd fam bikin. Vêca di serî de em bi çend gotinên di derbarê sîyaseta û guherînên wê de destpê bikin.

Insan çawan ber bi hiş de hatîye û ketîye mulahezekirina hînbûna sîyaseta, yan wek dibêjin karîye bifikire* '. Ew fel û fetlên ku ji bo jîyana rojane û parîyek nan bikar dianî, di jîyana wî de yekemin roja bikaranîna sîyaseta sade bû.
Wek her bûyerek din ên jîyana, siyaset jî wiha peyda bû, bê sekinandin ber bi guherandin û pêşdeçûnê de bûye û dibe. De-
(*)
y ' Di hejmara 17'an û rûpelên 2-29'ê "Karwan" de hatîye belav ki¬ rin.
*) Ji bo amadekirina vê gotare min feydek mezin ji wan muhazeran wergirtîye ku min bi alîkarîya gelek serokanîyên cihê ji bo sinifa çaran a Beşe Dîroka ya Fakulta Edebiyata ya Unîvetsîta Bexdadê amade kirine.
78
mek siyaset bûye pîşe, hûner û zanistî. Dema ku civak û dewlet peyda bûn, siyaset bû erkê yekem ê li ser milê piranîya dezge û karbidestên û her ji ber vê jî gotina "polîtîka" ya Grekîya kevin ku mana kar û baran civakê yan en dewleta dide, bi mana "siyaset" têkelê zimanê Awrupîyan bû* '.
Piştî peydabûna dewleta, dîn jî di pêşdebirina sîyaseta de rolekê mezin lîst. Dîn, bê siyaset nedikarî belav û berfireh be. Di destpêka sedsala 4'an de dînê Isayî û dewlet" têkelê hev bûn, piştî demek kurt papazên wisa peyda bûn ku di warê sîyaseta de dikarîn bibin mamostê dehan mîr û paşayên dema xwe.
Pêxemberê me jî, silavên Xwede lê bin, her di roja yekem a derketina Islamîyetê de tund tund siyaset û dîn bi hev ve gire da. Namen wî yên bi nav û deng ên ku ji bo paşayên Rum, Fars û

Hebeşan hatine nivîsîn, nimûnên pêşîn en peywendîya dîplomasîya cîhana nû ya Musilmanan in.
Wek me got, destpêka sîyaseta bi yekcarî sade bû. Li gel peydabûna desthilat û damezirandina dam û dezgên mîrî, siyaset ber bi alozîyê de çû.
Berjewendîyên jîyana rojane û pêşdaçûyîna têkelbûna gelên cîran û yên nezîkî hev, di rojen kevin de bûn sebebê peydabûna peywendîyên navbera dezgên mîrî yên cîhana pêşkevtî yên wî çaxî. Di destpêka de û heta demek dûr û dirêj, peywendîyên wan rojane û bê aloz bûn. Çi dema ku pêwîst buya, heyetê welatek ji bo girêdana peymanek an birina dîyarîyek an gîhandina emanetek an ji bo xwazgînîya şehzadeyek berê xwe didan welatekî din û piştî cîbicîkirina karan xwe, cardin ber bi welaten xwe ve vedigerîyan. Her çendîn erkê ser milê heyetên wiha, hêşan û be ser û bin bûn jî lê cîbicîkirina wan demek dixwest, carên wisa hebûn ku meh li ser de derbaz dibûn û heta xwe digihandin salan. Çûn û vegerîna wefdê bi nav û deng e Harun Reşîd li ba Şarlmanê Mezin, nezîkî salek ajot.
*) Gotina "polîtîka" ya Grekî ji "polîs" tê, ku me'na wê dewlet e. Dîyar e gotina "polîs" jî her ji wê hatîye.
79
Erkê heyeta ku navê wî derbaz bû, ji gîhandina namek û seetekê xelîfeyê Musilmanan ji bo qralê gawuran pêk dihat. Piştî vê, dor û berê çarsed salan, dema ku Marko Polo yê bi nav û deng li gel bab û mama xwe, li ser daxwaza fermanrewayên Venedîkê ya Italîya çû xizmeta Xanê Çîn û Maçînê, tam piştî 24 salan vêca vegerîyan welatê xwe. Ew di sala 1271'an de çûn di sala 1295'an de jî vegerîyan*). Marko Polo, nêzîkî sê sal û

şeş mehan riya navbera Venedîkê Awrupa û Pekîna*4) Asya temam kir û heta axa me jî beşek bû ji wan navçe û welatên ku ew bi peyatî jê derbaz bûn.

Li gel peydabûna rejîmên sermayedari û durustbûna hejma¬rek dewletên mezin ên desthilatdar, qonaxek hesûdî ya nû di jîyana sîyasî ya gelan de destpê kir. Yek ji wan dewletên Awrupayê yên mezin ji sinorên xwe razî nebûn. Her yekî ji wan çavên xwe berdabûn saman û axên gelên din û di nav xwe de jî destan xwe kiribûn pesîra hevûdu. Her ev yeka han têt zanîn ku pata agirê şerê bilind dibû û bi hezaran û deh hezaran dibûn qurban. Ew şerên Awrupayê yên wextê Napolyon Bonapart, yanî destpêka sedsala 19'an, gihîştin sevîya tirsên wisa ku dîroka heta wê demê nimûnên wisa nedîbûn. Zerarên mezin ên wan seran û acizbûna bêsinor a gelên Awrupayê, pal dan ber fermanrewayên xwe ku ew welat zêdetir bikevin ser rêbaza çareserkirina aşîtîyane ya problemên nav wan dewletên. Ji ber vê yekê sîyasetkaran bi pewîstî zanîn ku dezgekê bilind ji bo çavdêrîkirina peywendîya navbera dewletên mezin damezrînin. Ew gihîştibûn wê bîr û bawerîya ku qet nebe ew meselên ku dixwazin bi çek, xwîn û şer hel bikin, bi kêmasî hi¬nek ji wan di riya axaftin û dan û stendinê de bên çareser kirin. Ji bo ve mebestê, piştê ketina Napolyon, Kongra Vîyanayê bi¬ryare damezrandina cure meclisek dabû ku li gor vê car û caran nûnerên hejmarek dewletên mezin ji bo muzakerên ser behsen girîng ên cîhane dicivîyan.

(3)

v ' Marko Polo, sala 1254'an ji dayîk bû û sala 1324'an koça dawîyê kir.

*) Bi zimanê Çînî me'na "Pekîn" "paytextê Bukûr" e.

80

Piştî Kongra Vîyanayê û bi taybetî piştî salan 70'yên sedsa¬ la 19'an, welatên sermayedar! yên pêşkevtî gihîştin qonaxa emperyalîzmê, siyaset û peywendîya navbera wan dewletên ket nav rewşek nû yê yekcar mezin û aloz, hindî ku diçû astengên wan zêdetir û baran wan girantir dibû. Encama kar gihîşt we derecê ku fermanrewayên wan wek hêvîya dawîyê, ji bo çareserkirina piranîya problemê welatên xwe yên bingehîn dest avêtin çek. Bi vî awayî destpêka meha Tebaxa sala 1914'an, şerek berpa bû ku dîrok heta wî çaxî di nimunen xwe de tiştek wisa nedîbû. Ev şerê han şerek wisa bû ku hemû girtin nav xwe û bi heqî jî navê wî danîn "Şerê Cîhana yê Ye¬ kem".

Zerarên Şerê Cîhana yê Yekem, gelek mezin bûn. Tene yên ku di bin cil-bergên eskerî de, di şer de hatin kuştin, nêzîkî 10 milyon kesan bûn. Ew ên ku di meydanên şer de birîndar bûn nêzîkî 20 mîlyonan bûn ku sê milyon û nîvê wan heta mirinê seqet man. Ji sedî 50'yê xortan, 4 000 gund, 23 000 fabrika, bingehên hesin û repyê, 550 000 xanî û tenê 58 000 kîlometro rê û ba¬ nan Fransayê*) bûn xwarina agirê Şerê Cîhana yê Yekem ku bi kêmasî 360 milyon dolara zêr hat xerc kirin. Ev pere, ji pereyên ku yên di hemû şerên berê vî serî de hatibûn bikaranîn, zêdetir bûn.

Ev rasteqînîyen han divê hindurê herkesi bihejînin û di saha sîyaseta de gelek serene û nirxandinên nû bînin holê. Bele damezrandina Komela Gelan yek ji encamên wî yên serekî bû.

DAMEZRANDINA KOMELA GELAN

Bi temambûna Şerê Cîhana yê Yekem re, hejmarek karbides¬
tên dewletên mezin ji bo cîhana piştî şer ketin damezirandina
rêxistin û dezgeyeke bilind a navbera dewletên . Ji bo vê ar¬
manca Fransizan komîtekê taybetî di bin serokatîya Wezîre
Kar de damezrandin. Fermanrewayên Dewletên Yekgirtî yên
*) Temene Şerê Cihana yê Yekem 4 sal 3 meh û 9 roj bû, şer di nav
axa Frenseye di zede nedomand.
81
Amerîkayê ji hemûyan zêdetir qîmetê dan vê meselê. Ew ku
şer bû xêr û bereket li ser de rijîya, ji berê salan şerê gelek zêde¬
tir dewlemend û xurttir bûn, ji ber vê dixwestin cîhana sîya¬
seta piştî şer, rêxistinên wek vê jî têkin bin destê xwe.
Li gel temambûna şer, damezrandina Komela Gelan (League
of Nations) bû sloganekê rêxistinî, ji ber vê Kongra Aşîtî ya
Parîsê ya ku roja 18'yê Kanuna Duyem a sala 1919'an hat
çêkirin, bi taybetî qîmetê pê da û roja 25'ê Kanuna Duyem a
eynê sala cîbicîkirina wê siparte komîtekê bilind a bin serokatîya
W.Wilson ê serokkomarê Dewletên Yekgirtî yên Ame¬
rîkayê.
Dîyar e her yek ji dewletên serkevtî dixwestin programa
Komela Gelan bi curek be ku di hemû milan de li gel armanc,
plan û berjewendîyên wan de bigunce. Fransizî rikoyî bûn li ser
wê ku komel bibe çiqlên çavên Almanên cîranê wan ku bi çava
babkujîyê li wan dinêrîn. Wan daxwaza damezrandina hêzekê
serbixwe ji bo komela dikilin, çimkî dizanîn ku eskerên siwarî
û piyade yên wê çaxê yên Frensa mezintirîn heza çekdar
a cîhana ye, lê ev haza han bi navê gişt dewletên mezin ên ser¬
kevtî dê bikeve bin destê wan.

Programa Ingilîzan rê nedida damezrandina rêxistinek fi¬
reh, wan dixwest meclisek taybetî ji bo nûnerên welatên mezin
damezrînin ku divîya kara ser milê wê ji parastina rewşa nû
ya cîhane pek bê. Ingilîzan, her çi xwestibûn ji ber sebebê şerê
ketibû destê wan û ji ber vê jî ji "beşa xwe" razî bûn. Dijî wê bûn
ku kesek destê xwe têke nav kar û bara welatên bindes-tên wan
ku wê çaxê pîvana wan cîyên bin destê wan digihîşt 35 milyon
kilometre çargoşe (km2) û hejmara nifusa wan jî digihîşt 450
milyon kesan.
Li ser behsa damezrandin û programa Komela Gelan,
Amerîkî bi curek din hatin pêş. Washington dixwest
rêxistinekê cîhanî ya fireh bê damezrandin û hemû dewlet bi¬
bin endamen wê, da weko bibe cîyê lêkolîna rewşa welatên,
heta dijê wê jî bûn ku Almanya bi zû nebe yek ji endama wê, ji
ber ku dixwest bi wê riya re serkeşîya Ingiltere û bi taybetî ya
Fransa kêm bike. Ji vê jî zêdetir, nûnerên Dewletên Yekgirtî
yên Amerîkayê di wan rojan de heta derecek "alîgirê"
82
dîyarkiri-na mafê çarenivîsa gelan bûn, dixwestin Komela
Gelan wî mafî bike sloganeke xwe ya sereke. Her wiha li gel
bazirganîya serbest û vekirî re bû, di vî warî de slogana
"derîyê vekirî"* ' hildabû. Mebest ji "derîyê vekirî" ji bo
hemûyan bêferq rêdana damezrandina peywendîyên aborî yên
azad bû. Bi van sloganan fermanrewayên Washingtonê bi
tundî derîyên girtî dixistin.
Ev xwestin û daxwazên Amerîkîyan ku heta derecek, gelek
li gel başî û berjewendîya netewên biçûk ên cîhana de diguncan,
bê sebeb nebû. Evên han hemû kirinên sîyasetekê mezin û

dûrbîn bûn ku xizmeta armancên Dewletên Yekgirtî yên Ame¬
rika yên serekî û bingehîn dikirin. Samanên netewî yên wî we¬
lat! ji ber şer ji hesaba derket, bazara navbera cîhana Rojava,
bi sera xwe êdî bersîva berhemên sanayî, hasilatên ziraî û
perên wan ên kombûyî nedida. Ev mîsala han tenê bes e ku em
bê ger bejin, li gel temambûna Şerê Cîhana yê Yekem, ji sedî
40'ê hemû zêrê cîhana ket bankan Dewletên Yekgirtî ya
Amerî-kayê ku qerzên (deynên) wî welatî yên li ser Ingiltere,
Fransa û hejmarek welatên sermayedar ên din, gihîştibû 14
milyar dolaran. Berê ku şer destpê bike, sala 200 milyon dolar
qerz dida van welatên. Çi heye ku ev welatên han ên yekcar
dewlemend ji hasilatên ziraî yên welatên bindestê xwe mehrum
bûn. Pîvana wan melbend û navçan ku ketibûn bindestê wî,
hinek ji çarîk milyon kilometre çargoşe zêdetir bû. Li beranberê
wî, Frensizan nêzîkî 12 milyon kilometre çargoşen axa gelan
li gor daxwaza xwe talan kiribûn. Wî çaxî pîvana welatên
bindestê Ingiltere ji 35 milyon kilometre çargoşe derbaz dibû û
hejmara nifusa van welatên, wek me got, digihîşt 450 milyon
kesan. Yanî ew axên ku destê Frense de, nêzîkî 45 qat yên
Ingiltere jî nêzîkî 135-140 qatê axên bindestên Dewletên Yek¬
girtî yên Amerîkayê bû. Ji ber vê yekê, dibû Washington he-
*) Vê gotina han, "derîyên vekirî" yan "el-bab'ul-meftûh", cara
yekem karbidestên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê di sala 1899'an
de bikar anîn. Wê demê ku dixwestin bi vê bahana xwe bigihînin ba¬
zara fireh a cine ya ku di deste dewletên mezin en din de bû.
83
wil bide her çawan dibe bira bibe, derzek bike dîwara vê kela
han a asê ya hevpeymanê xwe yê do. Li gor programa Amerîkîyan

Komela Gelan dikarî di vî karî de rolek bilîze.
Lê ne mizana hazên çek û ne jî mizana imkanên aborî yên wê çaxê rê neda yek ji wan programan ku bi tevayî bi ser kevin, ev yeka han jî bi sera xwe bû yekemin sebebê lawazîya komela ji dayîkbûnê.
Komita taybetî ya W. Wilson, karan xwe temam kir û prog¬rama xwe ya ji 26 xalan pêkhatî ji bo Komela Gelan danî. Ev 26 xalên han, bûn beşa yekem a wan peymanên ku di Kongra Aşîtî ya Parîsê hatin îmza kirin. Peymana Versailles a di navbera Almanya û hevpeymanan de hat imza kirin, ji tevan girîngtir bû.
ENDAMETÎ Û DAM Û DEZGEN KOMELA GELAN
Bi vî awayî di sala 1919'an di Kongra Aşîtî ya Parîsê de Komela Gelan hat damezrandin û paytextê Swisre (îsvîçre) Cenevre, bû bingeh, Ingilîzî û Frensiz jî bûn berpirsîyarê wê ya giftugo û weşanên belgên. Du cur endamên komela hebûn; damezrêner û helbijartî. Ew dewletên hevpeyman ên ku li Parîsê programa Komela Gelan îmza kirin û her wiha ew dewletên ku di salan Şerê Cîhana yê Yekem de bê alî bûn, bê tu mercek (şertek), di navbera du mehan de wan jî eynî programa îmza kirin, bûn damezrênerên komela. Hejmara endamên damezrênerên komela ji 44 dewletên pêk dihatin, ji wan 31 dewletên hevpeyman û 13'yê din jî dewletên bê alî yên wek Swisre, Swêd, Norveç, Danimarka, Ispanya, Iran û Arjantin bûn. Hejmarek dewletên din jî di pê hev de ji bo endametîya komela hatin helbijartin, wek Almanya di sala 1926'an, lraq di sala 1932'yan, Yekîtîya Sovyet di sala 1934'an, Misir di sala 1937'an de hatin helbijartin. Heta vêketina agirê Şerê

Cîhana yê Duyem, hejmara endamên Komela Gelan gihîşt 58 dewletên.
Organên komela ya herî bilind Kornîta Giştî bû ku hemû dewletên beşdar ên komela endama wê bûn, divîya bi kêmasî sala carek di meha llonê de bicive.
84
Her çendîn dewletek dikarî hejmara nûnerên xwe bike sê kes, lê her mafê wan ê yek dengê hebû. Li ser daxwaza pi¬ ranîya endamên di wextê pêwistîyê de, diviya Komita Giştî bicive. Hemû biryaren girîng ên organên komela dawîyê de diketin bin destê Komita Giştî ku biryara wergirtina endamên nû û helbijartina sekretere giştî yê komela jî mafên wê yen serekî bû.
Her çendîn li gor rêzê encûmen organa duyem a Komela Gelen bû, lê kar û baran wê ji ya tevan gelek bi qîmetir bû. Di rastîya xwe de encûmen haza aktîf a komela bû.
Di destpekî de biryar wisa bû ku encûmen ji neh endamên pêk bê, 5'ên wan daîmî û 4'ên wan jî demî (meweqqet) bin. En¬ damên daimî nûnerên dewletên mezin ên hevpeyman ên serkevtî bûn, yanî Ingiltere, Dewletên Yekgirtî yên Amerika, Frensa, Italya û Japonya. Çar endamên din, bi dor dihatin helbijartin.
Lê ev bûyerê han wek hatî danîn neçû serî û çend guhertin tê de çêbûn. Ji ber gelek sebebên ku em ê dawîyê de bi kurtî behs bikin, Dewletên Yekgirtî yên Amerika nebû endama Komela Gelan, ji ber vê yekê cîyê wê di encûmen û Komita Giştî de vala ma. Çend salek berê Şerê Cîhana yê Duyem hejmara en¬ damên Encumena komele bû 15 ku 9'ên wan demî û 6'ên wan jî

daîmî bûn. Evên dawîyê ji Frensa, Ingiltere, Yekîtîya Sovyet, Almanya û Japonya pêkdihatin*. Diviya encûmen bi kemasî sala carek bicivîya. Demê din, li ser daxwaza piranîya endamên, çend car pêwîst buya diviya ewqas biciviya.

Sekreterê Giştî û alîkarê organa sekreter, kar û baren rojane yên Komela Gelan cîbicî dikilin. Sekreterê Giştî ji alîyê encûmen de dihat helbijartin û diviya ku dengê hemû endamên bigirta. Piştî vê diviya di Komîta Giştî de hemû yan piranîya endamên deng bidinê.

(7)

y " Herçiqas, wek em ê di dawîyê de jî behs bikin, Japonya û Almanya li pê hev de, sala 1933'yan û Italya jî piştî wan, sala 1937'an ji Komela Gelan kişîyan, lê ciye wan ji ber hevîya ku ji hespê Şeytana peya bin û cardin vegerin nav komele, vala ma.

85

Ji derveyê van tiştên ku me behs kirin, bi rêvebirina hejmarek komite û organên din ên demî û cîbicîkirina beşek ji wezîfên komela jî ketibûn ser milên Komela Gelan ku em ê di dawîyê de behs bikin.

ARMANCA KOMELA GELAN

Li gor destur û programa, diviya armanca yekem a Komela Gelan parastina aşîtîyê be, da ku cihan tuşa facîakî metirsî ya wek Şerê Cîhana yê Yekem nebe. Yek ji madan serekî ya programa komela wiha digot: pêwîst e hewil ber bi her kar û fermanek re bê dan ku bê zanîn ev "aşîtîya gelan bi curekî aktîfî dije şer û êrîşên şer diparêze".

Madek din a eynî programa, sebebê damezrandina Komela Gelan digihand ji bo pêwîstîya pêşdebirina alîkarîya navbe¬

ra gelan û temînkirina bê tirsî û asayîşa wan". Pêwîstîya kêmkirina hazên çekdar ên dewletên, madek din a programa Komela Gelan bû.

Li gor programa komela dibû bi sebebê tehkîmê ve, yan di rîya encûmen ve problema navbera dewletên bê çareser kirin. Ger encûmen negihişöya encamekê qayîlker, wî çaxî heqê en¬damên hebû her yek li gor nêrîna xwe beşdarîya wê meselê bi¬kin. Her wiha programa komela, abluka aborî û karanîna vê hazê kiribû cezaya gunehkaran. Heta diviya encûmen biryara dereca beşdarîya hazê endamên komela ji bo cîbicîkirina erk û van biryaran bide. Lê di sala 1931'an, li gor biryarekê taybetî, ji bo li hember rawestandina êrîşkeran, cezaya aborî kir "çekê serekî" ya komela.

Beşek bi qîmet ji naveroka programa Komela Gelan, bi awakî wisa hatibû durust kirin ku firset û alîkarîya dida destê hazê dewletên mezin. Wek mîsal, ew madda ku behsa kêmkirina hazê çeken cîhana kirîye, bi awakî wisa pûç bû ku dibêje hemû dewlet, ji bo parastina hecma netewa xwe û cîbicî kirina erken ser milên xwe, pêwîst e ewqas mafe wan dewle¬tên bi hazên çekdar hebe.

Durustkirina bi vî awayî programa komela û çend rastîyek din, bûne sebebê piranîya kil û kêmasîyan ve dezga han a cîhanî ya girîng.

86

KIL U KEMASÎYEN KOMELA GELAN

Wek me dît, di wextê Kongra Aşîtî ya Parîsê de, hemû alîyên desthilatdar, di keft û leftê de bûn ku Komela Gelan bikin bin destê xwe. Dema ku ev kara han ji bo Dewletên Yekgirtî

yên Amerika neçû serî, Washington biryar da ku nebe endam
*). Li ser ve biryare yekem valatî ket bingeha Komela Gelan.
Ji ber ku wê çaxê, Dewletên Yekgirtî yên Amerika, mezintirîn
haza aborî û yek ji wan hazên sîyasî yên aktîf ên cîhana bû.
Di destpêka de ji Almanya û welatên din ên mexlûb re rê nehate
dan ku bibin endama komela. Her wiha Yekîtîya Sovyet
jî ji wî mafî bêpar kirin. Hîn ji vî jî zêdetir, gelek caran Encû¬
men û Komita Giştî, bi taybetî û bi awakî gelek germ diketin
behsa têkbirina nav Sovyetê. Di kêm behsên din de piranîya
endamanên komela bi vî awayî hevdeng bûn.
Welatê biçûk û yên bindest, gelek zehmet dibûn endama Ko¬
mela Gelan. Bi alîkarîya Frensa nebûya endametîya Hebeşîstanê
qebûl nedikirin. lraq piştî 10-12 û Misir piştî nêzîkî 17 sa¬
lan xebata aktîf girtin*9). Ev kil û kêmasî û şaşîtîyên Komela
Gelan, netîca wê yekê bûn ku Frensa û Ingilistan bibûn axayê
mezin ên vê dezga han a cîhanî. Aşkera ye ewan jî li gor berjewenda
xwe çawan bixwestina bi wî awayî problem derdixistin.
Ji derveyê vê, armancek wan a din jî hebû ku dixwestin ji
bo parastina rejima sermayedarî ya dijî tevgera şoreşgeran û
Sovyetê Almanya bikin mertalek bi hêz. Ji ber vê yeke jî bê ku
kes hêvî bike, roja yekê îlona sala 1926'an rê dan ku Almanya
(' We demê "Partîya Komarî" desthilata girt dest û eva han jî bû
sebekê din ji bo ku Dewletên Yekgirtî yen Amerika nebe endama Ko¬
mela Gelan. Ev komela han bi rêveberîya W.Wilson e serokê kevn ê
komare hatibû danîn. Wilson, nûnere "Partîya Demokrasi" bû ku li
gel "Partîya Komarî" re du bereyen sîyasî yen serekî yên Dewletên
Yekgirtî yên Amerika bûn.
*) Ji bo direjahîya vê behse binere: Tarîxu'l Wezaretu'l-Iraqîyye

ya Edurrezaq el-Hesenî. Her wiha Dr. Yunan Lebîb Rizq, El-Diblomasîyyetu'l
Wefdîyye we 'Esbetu'l Umem-El-Sîyasetu'l Duwelîyye
(kovar), Çjahîre, hejmar: 34, sal: 1976, rûpel: 118-137.
87
him bibe endama Komela Gelan, him jî cardin wek dewletek mezin bibe yek ji wan endamên daîmî yên Encumenê.
Bi rastî jî dewletên mezin ji bo Komela Gelan pir xem nedixwarin. Hemû bi başî têgehîştibûn ku komel nikare bibe dezgehek cîhanî ya aktîf. Roja 27'ê Adara sala 1933'yan , Tokyo bi awakî bêperwa xwe ji komele kişand. Sebebê vê yeka han, tenê ji bo wê gilîya nerm a di netîca êrîşa eskerên Japon li ser Bakûrê Çîn bû ku ji alîyê komela de lê hatibû kirin. Sal li ser de derbaz nebû, piştî ku Hîtler û Nazîyan desthilat wergirtin, Almanya jî roja 14'yê meha Çirya Yekem a eynê sala (1933) xwe ji Komela Gelan kişand. Problema derketina wan jî li ser wê yekê bû ku Encumenê biryara hilanîna wan beşên "Peymana Versaille" ku peyvendîya wan bi kar û baran eskerî yên Al¬manya ve hebû, neda. Ji vê jî zêdetir, siyaset û armanca Hîtler di her halukarê de ji bo Almanya, dezgahekê wek Komela Gelan de li hev nedihat.
Piştî xwekişandina Almanya û Japonya, alozbûna rewşa sîyasî ya cîhana bi sebebê Nazîyên Almanya, faşîstên Italya û mîlîtarîstên Japonya , încar Sovyet hat bîra Londra û Paris û bi peşnîyara Fransa roja 15'yê îlona sala 1934'an, 30 endamên Komela Gelan bi hev re daxwaz ji Sovyetê kirin ku bibe en¬dam. Piştî sê rojan Moskova razîbûna xwe gîhand wan û bi vî awayî Sovyet bû yek ji wan endamên Encumenê ya daîmî. Lê

di destpêka Şerê Cîhana yê Duyem de, piştî vêketina şerê navbera Finlandiya û Sovyet (1939-1940), cardin ev welatê han ji Komela Gelan hat dûrxistin.
Bi vî awayî em dibînin ku ew tovê ku li Parîsê ji bo Komela Gelan hat avêtin, ew ax û erda ku tê de perwerde bû ewqas musaît nebû ku berek baş jê bihata hêvî kirin. Ev rastîya han, bi alîkarîya xurt a dewletên mezin jî, bû sebebê sernekevtina komele wek dezgahekê cîhanî. Li vir de ev yeka han tenê bes e ku em bêjin: hemû bi ser hev 21 sal li ser qewimandina Şerê Cîhana ye Yekem de derbaz nebû, vêca dema ku cîhana xwedî rêxistinek wek Komela Gelan, çirîskên agirê serekî hîn ji wî belavtir qewimî. Ji ber vê, da em bi kurtî carek bên ser behsa wan milên heja yên jîyana gelan û cîhana ku komela nekarî rolek wisa tê de bilîze, ji ber ku heryek ji wan bûyeran bi curek rê

ji bo şerê nû yê cîhana xweş kirin, ew şerê ku hewce bû Komela Gelan bi tu awayî rê ji bo destpê kirina wî nedaya.
EW KAREN KU KOMELA GELAN ÇARESER NEKIRIN
Ji destpêka sala 1920'an û heta paçana dam û dezgên Komela Gelan di Nîsan sala 1946'an, yanî demek çarîk sedsal temenê Komela Gelan de, 66 meselên navbera dewletên ketin bindestê Komela Gelan. Lê, gelek mixabin nekarî çareyek girîng û hêja ji wan meselan re bibîne. Ev çend mîsalên jerê çendek ji wan ên serekî ne.
Yekem: Şerê Japonya û Çîn
Dema dawîyê sedsala 19'an Japonya ser xwe ve hat, jîyana aborî û imkanên xwe yên eskerî hinek ber bi pêş de bir, wek dewletek mezin hat naskirin û ji wê rojê şun de jî Tokyo çava

xwe berda ax û senvetên Çîn û Maçîna cîranê xwe.
Şerê Cîhana yê yekem, hinek din Japonya dewlement kir.
Wek belge li vir tenê em du nimûnan dixin li ber çav. Sala 1914'an heta sala 1919'an, qîmeta berhemên kel û pelên pîşesazîya Japonya, ji 13 mîlyar yenan*) gihîşt 65 mîlyaran.
Pênc car, yanî, sedî 500 zêdetir bû. Di bin çar sal Şerê Cîhana yê Yekem de, yanî ji sala 1914'an heta sala 1918'yan, hecma bazirganiya Japonya li gel derve du car û nîv zêdetir bû û zîv û zêrekî be hejmar di bankayên Tokyo de berhev bû. Ev yeka han bi derecek wisa bû ku êdî piranîya dewletên mezin ên Aw¬ rupayê ketin ji Japon pere deynkirinê*).
Bi vî awayî Japonya, bi çavekê hesudî li Çîna dewlemend a pêşkevtî dinêrîya. Ji ber ku fermanrewayên vî welatî dilxweş UU; "yen", pere Japonya ye. Çjimeta wî ber bi guherînê de ye. 300 yen, dolarek e. Yen, îro pere cîhane ye herî bi hez e. Li gor Banka Merkezî, dînarek nezîkî 750 yen e.
* ' Piştî Dewletên Yekbûyî yen Amenîkayê, Japonya duyem dew¬ leta cîhane bû ku feydeyek mezin ji wê rewşe wergirt ku Şerê Cîhane ye Yekem anî hole.
89
bûn ku emperyalist nabin asteng li ser riya wan. Hazên çekdarên wan roja I8'yê îlona sala 1932'yan ketin êrîşbirina ser Bakûre Rojhilata Çînê. Di destpêkî de Çîn pişta xwe bi dewletên mezin gire da û xwest di rîya Komela Gelan re pêşîya vê destdirêjîya Japon bigre. Lê, komela tiştek jê re nekir, biryare wê yên di vî warî de bê lez û pişgguh avêtin bû û her bi wî awayî jî man. Japon bêyî ku guhê xwe bidê, sala din navçan îşxalkirî de hukumetekê serbixwe damezrand.

Duyem: Erîşa Italya Li Ser Hebeşîstanê

Dema ku faşîstan di dawîyê meha Çirya Yekem a sala 1922'yan de, îqtidara îtalyayê girtin destê xwe, dixwestin goya rojên borî yên Romayîyên desthilatdar zindî bikin û împaratorîyekê fireh û xurt damezrînin. Ji bo vê armanca, di her çar aliyan de slogana "Italya mezin" bilind kirin.

Faşistan, ji bo ku Derya Spî ya Navîn, Derya Sor û beşekê me¬zin ê Afrîkayê têkin bin destê xwe, har bûn. Heta di xerîteyên xwe de, ne kêm û ne zede, navê Derya Spî ya Naverast kirin "Derya Me".

Ji bo cîbicîkirina van armancên xwe yên fireh di Afrika de, Italya faşist berê hemû cîyek berê xwe da Hebeşîstanê û di destpêka sala 1935'an de bi navê serxwebûnîya Afrika, destpê kir hazên xwe anîn li ser sinorê vî welarî. Heta meha Tebaxa wê sala, Mussolînî ji bo şerê Hebeşîstanê 250 000 eskerên italya û 750 000 eskerên welatên bindestê xwe wan navçan de civandin.

Ji sala 1923 pê ve Hebeşîstan yek ji endamên Komela Gelan bû. Wek me pêş de got, endametîya Hebeşîstanê li ser piştgirîya Frensayê ji alîyê wê dezgê de hat qebûlkirin.

Çi heye ku li gel van tevan de jî, heta roja îlona sala 1935'an komele newêrîye giliya Hebeşîstanê bigre dest ku di roja 3'yê Kanuna Duyem a eynê sala dijî îtalya pêşkêş kiribû. Yanî piştî heşt meh û rojek komele hay li vê yeka han bû.

Rast e, Komela Gelan li ser mesela Hebeşîstanê dereng biryare abloqekirina aborî ya li ser îtalya faşist da. Lê, bi alîkarîya Frensa û Ingilistanê, neft û benzîn di ve lîsta han a kel û pelan de cî negirtin. Wî çaxî jî bi taybetî ji bo zivirîna

çerxa şerê faşistan, ji petrol û benzînê pê ve pêwîstîya îtalyayê bi tiştek tûne bû. Ji ber vê, biryara Komela Gelan a derbarê destdirêjîya Italya faşist li ser Hebeşîstanê, qet feydek neda. Faşîstan xwe lê negirtin û heta bi awakî gelek hov welatê Hebeşîstanê yê fireh îşxal kirin. Di vî serî de hejmara tenê yên ku ji ber bikaranîna gazan jehr hatin kuştin, digihîşt 275 000 kesan! Çi heye ku gelek di ser de neçû, di navek re, ser daxwaza Londra û Parîsê, Komela Gelan biryarê ve nîv abluqa aborî jî li dijî îtalya rakir.

Seyem: Destekirina Nazî û Faşîstan

Di Nav Kar û Baran Hindurî En Ispanya de

Di rîya serxwebûnîya rasteqînî û mafê demokratik de, di Nisana sala 1931'an de gelê Ispanya şoreşekê mezin destpê kir ku nêzîkî heşt salan domand. Şoreşgeran, di destpêka de destkevtinên mezin dest xistin û karîn komareke serbixwe û de¬mokratik damezrînin. Vî karî han tirs xist dilê kevneperestên hindûr û yên derveyê welat. Gelek di ser de neçû, dijminan planekê ji bo xistina komara sava ya Ispanya saz kirin. Di Tîrmeha sala 1936'an de, agirê şerê birakujîyê li vî welatî hat vêxistin. Her çiqas bere vê, 27 dewletên Awrupayê birya¬rê dabûn ku kes dest têneke nav kar û bara hindûrî yê Ispanyaya, lê nazîyên Almanya û faşîstan îtalya wek tev ka¬ran xwe yên din, xwe bi vê girênedan û di Tîrmeha eynê sala de ji bo serîhildana kevneperestên Ispanya ketin birina çek û danîna hevpeymanên cur bi cur* \ Faşist û Nazî bi vê yekê tenê neman, ji ber ku, ji bo armanca derêxistina reh û rêçên ha¬zên pêşkevtîxwaz en îspanya, dest avêtin bîlfîîl hezên xwe

yên çekdar jî birin. Hejmara wan çekdarên Almanya û îtalya ku anîn Ispanyaya, gihîşt nêzîkî 300 000 kesan. Wisa lê hat ku di navbera 32 mehan de qet tu çek nema ku li dijî şoreşgeran îspanya bikar ne anîn.

*) Heta tank û firoke jî şandin (nota ll'an di orîjalê kiteba de du car hatibû nivîsandin. Ji ber ve me nota ll'an a diwîye kir 12 û notek jî zedebû -Elîşêr).

Li gor naveroka programa, diviya Komela Gelan yekem dezge be ku li ser Ispanyaya dengê xwe bilind bike. Lê ji bo Al¬manya û italya biryara abloqakirina aborîyê jî neda ku ew li ber çavên tevan ketibûn veçirandina gîyana civakên xelkê ispanyaya. Dema ku di meha Çirya Duyem a sala 1936'an Komara îspanya gilîya xwe pêşkeşe Komela Gelan kir, Frensa û Ingilistan -bibe guhar bikeve guhê wan- karek wisa kirin, ku ne Encûmen û ne Komîta Giştî nekarîn behsa ispanya bikin. Tenê komîtekê serbixwe damezrandin, ewê jî tenê biryarên dewletên Awrupayê dubare kirin ku gûya nabe kes dest bike nav kar û baran hindurî yên Ispanyaya. Di rastîya xwe de ev biryara han tene ji bo şoreşgeran çû serî, ji ber ku cepha wan ji peydakirina çekan bêpar ma. Ev yeka han demek wisa jî bû ku faşîstan li gor dilê xwe hesp dibezandin.

Çarem: Destdirejîyen Almanya Hîtlerî

Ev cure rewşên Komela Gelan yek ji wan sebebên bû ku mil da ber Hîtler û Mussolînî da ku zêdetir ber bi pêş de gav bavêjin. Gelek li ser de neçû, nazîyan birek gavên tirşe avêtin ku evên han tev bi awakî aşkera li dijî çarçova programa Komela Ge¬lan û naveroka biryar û peymanên Kongra Aşîtî ya Parîsê bûn.

Almanya nazî bi curekê ku qet berê nehatibû dîtin ket çêkirina çek û tifaqen şerê û peşdebirina hazên cur bi cur. Tenê di navbe¬ra sê salan pêşîn desthilata Nazîyan de mesrefê Almanya ji bo kar û baran eskerîyê, ji mîlyarek mark gihîşt deh mîlyaran. Yanî deh caran zêdetir bû. Hejmara yekemin sedî 2'yê û hejmara duyem jî seda 17'yê hebûnên neteweyî yen Alman pêkdihat. Her di wan navan re hejmara cure çekê eskerên Al¬manya, ji dehan gihîşt 30 curan û di dawîyê de ev hejmarên han gelek zêdetir jî bûn. Di wextê xwe de li gor "Peymana Versaille" , diviya ku hejmara eskerên Almanya bi tu awayî ji 100 000'an zêdetir nebûya.

Dema ku kar gihîşt vê derecê, êdî Hîtler ji wê yeke silikatîyê nekir, cardin destpê kir hazên xwe yên çekdar anîn navçan Ren a ser sinorê Frensa ku li gor Versaille hatibû bêçekkirin. Roja 7ê Adara sala 1936'an, Hîtler ferman da ku 92 eskerên Reichstag a sayem*) bikevin nav axa Ren. Hejayê gotina ye ku wê çaxe hîn eskerên Fransa ji yên Almanya xurttir bû, her wiha di riya qanunî de jî mafê wê hebû ku pêşî li van pêşdeçûnên Almanya bigre. Dawîyê de ev yeka han jî derket ku Hîtler ferman dabû serekên eskerên xwe, gotibû ger Frensa bikeve bizavek nerizabûnê, ew yekser bê şer eskerên xwe paş de bikişînin. Lê ne Frensa û ne jî îngîlterê ji derveyî ku bêjin "ev pêşdeçûyîna han a Hîtler ne li gor "Peymana Versaille ye" pê de, tiştek nekirin. Ji ber ku vê yeka han wek karekî tir¬şe ya ji bo destdirêjahiya aşîtiya cîhane hesêb nekirin. Rewşen dewletên mezin, berê hemûyan Frensa û îngilistan, wisa kirin ku Hîtler hîn zêdetir ji xwe razî be. Tev li ser hev,

salek ser de derbaz nebû, Adolf*) Hîtler, di eynê meha sala bê de, yanî Adara sala 1937an, welatê Avusturya îlhaq kir (helluşî-daqurtand)*1) û kir ser Reîcha sayem. Tiştê ecêb ev yeka han bû; Londra, Paris û hevpeymanên wan, îşxalkirina Avusturya meselek wisa nezanîn da ku bigrin dest û bikin bin destê Komela Gelan.

' ' Reich, ji gotina Almanî "Reichstag" hatîye girtin ku ji du gotinên hevedudanî pekhatî ye: "Reich", yanî dewlet an împeratorî, li gel "tag" yanî kombûn an encûmen e. Wek termînolojîyek sîyasî ji sedsala 12'an ve hatîye bikaranîn. Zêdetir tê mana parlamentoya. Reichê Yekem û Duyem, du qonexen navbera sedsala 12'an û dawîyê Şerê Cîhane ye Yekem digrin. Reiche Sayem, di sala 1919'an destpê dike û bi temambûna Şerê Cihana yê Duyem re diqede. Herçiqas Reichstag di bin sîyaseta Hîtler de, wek piranîya dezgen demokrasîyê yen dinên Almanya, ketîye sewîya nebûnê, le çi heye ku li gel ve jî gelek dîroknivîsên dema Almanya Nazîyan bi "Reiche Seyem" bi nav kirine. Navê kitaba bi nav û deng a Wilyam Chirer a di derbare Almanya Nazî bi vê awaye ye: "Dîroka Almanya Hîtlerî, Damezrandina Reichê seyem û Ketina Wê".

*) Adolf navê wî û Hitler jî naznavê wî ye. Di esle xwe de navê wî Adolf Schicklgruber e.

*) Di dîroka de ji vî karî re "enşilyus" dibêjin ku gotinek Almanî ye û te mana xistina ser. Hellûşîn (daqurtandin, dabelandin-Elîşêr) Kurdî rastirîn gotine ji bo vî karî.

93

Cardin salek ser de derbaz nebû, yana eyne meha sala din, yanî Adara 1939'an, Hîtler ferman da eskerên xwe da ku Çekoslovakyaya serbixwe jî îşgal bikin û bikin ser Reîch a

Sayem. Hêjayê gotina ye ku îlona sala 1938'an, Komita Gişti ya komela di civînê de bû, wê çaxê jî Almanya eskerên xwe li ser sinorê Çekoslovakya amade kiribû, vêca li ser vê jî vê beh¬ sa han nenanîn holê. Hewce ye ev yeka han jî bê gotin ku Çekoslovakya yek ji dosta herî nêzîk ên Frensayê bû.

Pêncem: Ji Alîye îtalya Faşîst de îşxalkirina Arnawudistan (Albanya)

Wek Hîtlere hemfikrê xwe taqeta Benîto Mussolînî nedigihîşt. Eðer ji wî kêmtir nedikir. Xwedê jê re nehêle, lê ewî jî kêm nekir. Wek me di serpêhatîyên hedîsên Hebeşîstanê de dît, destdirêjahîyên Hîtler, Mussolînî zêdetir şidand. Ji bo ku Arnawudistan serbixwe heleqek qels a Awrupayê bû ku demek bû wî çav berdabûyê.

Faşîstan îtalya, tenê bi vê neman, ji ber ku di salan bîstan ve Arnawudistan kiribûn welatekî nîv bindest û di wê demê ve xeyala îşxalkirina wî kiribûn sera xwe. Di vê bûyerê de faşîstan ne qîmetê bi rayagiştî û ne jî Komela Gelan dan. Li ser destura Japonya û Almanya, îtalya jî di sala 1937'an de, xwe ji Komela Gelan kaşa. Gelek di ser de neçû eskerên faşîst, bêperwa li ber çavên hemûyan, di Nîsana sala 1939'an de, Ar¬ nawudistan îşxalkirin. Mussolînî da xuyakirin ku ev welatê han hemû her tim beşek ji dîroka îtalya bû!

Bêdengîya Komela Gelan û yên dewletên mezin li hemberê van destdirêjîyan, curek pêşkêşkirin bû ji bo Japonya, Italya û ji hemûyan jî zêdetir ji bo Almanya Nazî. Li ba wan, wisa bû ku bi vî awayî Hîtler ji Rojava dûr bixin û mil bidin çûna wî ya ber bi Rojhilat ve*1 . Lêbelê gelek di ser de neçû, zeman îspat kir ku ew heta çi derecê ber bi şaşHîye de çûn. Bi van cur

rewşan, Hîtler bêhed ji xwe razî bû, wisa dizanî ku kes nîne bikare mil bide mile wî.. Her bi vî awayî jî riya ji bo hilkiri-
* ' Mebest, Rojhilat û Rojavayê Avrupaye ye.
94
na agirê Şerê Cîhana yê Duyem xweş bû, ew şerê ku wek me got; divîya Komela Gelan rîya destpe kirina wî nedaya.
Ger wiha be -ku wiha jî bû- Komela Gelan dezgehekê cîhanî ya semekevtî bû. Lêbelê li gel vê de jî, tene bi sera xwe damez¬randina vê dezgê gavek bû ji bo rojên pêş ên jîyana giştî ya însanan. Ji derveyê vê, Komela Gelan her bi çi awayî be, karî hejmarek problemên nav dewletên çareser bike, bi taybetî di salan 20'an de, yanî destpêka jiyana xwe de.
EW KAREN KU KOMELA GELAN ÇARESER KIRIN
Ew meselên ku Kongra Aşîtî ya Parîsê firset nedît temam bike, sipartin Komela Gelan. Piranîya beşek ji wan meselên berhev bibûn, rîya çareserîkirina wan hatibûn dîyar kirin, ji ber vê yekê komela heta derecek ewan bi zû û rehet çareser kir. Beşekê din jî ku peywendîya dewletên emperyalist pê ve nebû, ji ber vê jî gelek zû hel bûn.
Di nîvê pêşîn a salan bîstan de Komela Gelan mesela sînorê navbera Arnawudistan-Yugoslavya, Yunanîstan-Bulgarîstan, Lîtvanya-Polonya û Iraq-Tirkîyê û her wiha çarenivîsa Salîzya Bakûr, netîca çarenivîsa navça Sari Almanyayê di riya dengdanê ve çareser kir. Grava (cezîreya) Korfo jî ku îtalîya zeftkiribû, da destê Yunanîstanê. Bi eynî destura daxwaza Swêd a ku dbcwest Grava Alanda ya nav Derya Baltikê ji Finlandiya bigre.
Hejmarek dezgên serbixwe yên Komela Gelan kêm an zade

xizmet kirin. Yek ji wan dezgên "Rêxistina Cîhana Kar" bû (17). Li gor programa vê rêxistinê, diviya ku ev rêxistina han ji bo bilindkirina sewîya jîyana karkerên, nehiştina bêkarîyê, tesbîtkirina sewîyek maqûl ji bo kira, parastina kara zarok û jinan û qebulkirina damezrandina sendikan serbixwe yên kar¬ kerên hewil bide û kar bike.

"Rêxistina Cîhana Kar", tiştek wisa zade ji bo karkerên nekir, bi taybetî ji bo karkerên welatên paşdemayî. Carên wisa

*) Yanî "Munezzemetu'l 'Emelu'l-Dewlîyye".

hebûn ku di dezge yan civînên giştî yên vê rêxistinê de, ji sê ke¬ sên ji wan welatên endamên Komela Gelan ve heyet pêk dihat. Dibûya yek ji wan nûnerê karkerên, yek nûnerê sermayedaran û kesê din jî nûnerê hukumeta wî welatî buya.

Ji bo ronîkirina vê meselê, tenê em dikarin vê mîsala han a 'ecêb bidin ku gelek caran kesên wek Cafer Eskerî, civînên rêxistina kar ên ji bo helkirina hinek meselên karkerên çêdikir, dibûn "nûnerê" karkerên wan welatan(18). Li gel van tevan jî, em dikarin bêjin tenê damezrandina "Rêxistina Cîhana Kar" destkevtinek hêja bû, ji ber ku sewîya pêşdeçûyîna tevgera karkerên cîhana nîşan dida, ew tevgera ku qet alîgirên wê tunebûn heta li hemberê van kil û kêmasîyan çav bên girtin.

"Rêxistina Tenduristî ya Cihana", "Mehkema Edalet ya Nav Dewletên" a Laheyê û "Komita Kêmayetîyan"(19) dez¬ gên din ên Komela Gelan bûn ku her wiha navê tevan li ser e.

NETÎCA KOMELA GELAN

Roj bi roj Komela Gelan ber bi sistbûnê de diçû. Berê Şerê Cîhana yê Duyem destpê bike, komele bêdeng bû û tenê sîya

wê mabû. Wisa lê hatibû ku kesekî êdî guhê xwe nedidayê.
Her çiqas Komela Gelan wek qanunî heta roja 18'ê Nisana sala 1946'an ma jî û piştê dawîyê meha Tîrmeha sala 1939'an şûn de, bi tu awayî dezgên wê necivîyan . Ve roja han, enda¬mên komela ji bo cara dawîyê li Cenevrê civîyan, dam û dez¬gên wê dan hev û erkên wê sipartin Koma Milletan ku ji wir şun de êdî wek dezgehekê cîhanî cîyê Komela Gelan girt.
*) Ji bo dirêjahîya ve behsê binêre: Dr.Kemal Mezher Ehmed, El-Tebeqetu'l-'Amîletu'l-Iraqîyye, el-Tekewwun we Bîdayatu'l-Teherruk, Beyrut, 1981.
*) "Munezzemetu'l Sihhe'l-Alemîyye", "Mehkemetu'l 'Edlu'l-Duwelîyye" û "Licnetu'l 'Eqellîyye".
96
KURD U KOMELA GELAN
Gelek car navê Kurd û Kurdistanê ketîye bin destê Komela Gelan û dezgên wê. Bedirxanîyan, Şêxên Berdeqareman, Hepsexan(20) û hejmarek din ji welatparêzan, çendîn car rapor û namên taybetî pêşkêşê vê dezga cîhanî kirine. Roja îmzakirina peymana sala 1930'yan a li ser Iraqê ya ji alîyê îngilîzên dagirker de, piştî qewimandina herî mezin û ya dil şewitandî ya roja 6'ê reşê îlonê, welatparêzan Kurd birek tel¬graf û namên protestoya şandin Cenevrê. Li ser meselên wek van, gelek caran Bedirxanîyan jî zû bi zû dengê Kurdan digîhandin rêvebirên Komela Gelan. Lê ji hemû wextan zêde¬tir dema civînên ser mesela Musilê, navê Kurdan ket ber destê endamên Komela Gelan û dezgên wê.
Berê Şerê Cîhana yê Yekem bi hemû wan navçan ve ji Kur¬distanê Basur re "Wilayeta Musilê" dihat gotin ku beşek ji

împeretorîya Osmanî ya fireh bû. Nîvê sala 1917yan, eskerên Britanya ji bo daxwaza dagîrkirina vê melbendê çend milan de ber bi Bakurê Bexdayê ve ketin rê(21). Dema ku di Çirya Duyem a sala 1918'yan de "Agirbesa Mondrosê"(22) dawî bi şerê navbera dewletên hevpeymanan û împeretorîya Osmanî anî, hîn eskerên îngilîz 12 mîl ji Musilê dûr bûn. Dawîyê şer û ser serkevtina Kemalîstan, Tirkiyê vê yeka han ji bo "doz kirina" Wîlayeta Musilê kir bahane. Bi vî awayî meselek navneteweyî peyda bû ku bi navê Mesela Musilê ket nav belge û rûpelên dîrokê(23).

(20) Mebest, Xwede jê razî be, Hepsexanê Neqîb e.

(21) Li gel destpêkirina Şerê Cîhane yê Yekem eskerê îngilîzên ji Başûr ve ket îşxalkirina axa Iraqê, heta roja 11 'yê Adara sala 1917'an gihîşt Bexdadê û piştî vê vêca ber bi Kurdistanê ve ket re.

(22) Agirbes, yanî "Hedne".

(23) jj ij0 direjahîya vê behsê binere: Dr.Fadil Huseyn, Muşkiletu'l Mûsil, Dirasetu Fî'l-Dîplomasîyye'l-lraqîyye -el-Ingilîzîyye -el-Tur-kîyye we fî'l-Re'yî'l-'Am, el-teb'etu'-ûla, Bexdad, 1955, rûpel: 336. Ev kiteba han teza doktora wî ye, sala 1952'yan pêşkêşê

97

Mesela Musilê, bû yek ji wan behsên serekî û ket nav rojeva Kongra Lozanê ku li dor û berê dawîyê Çirya Duyem a sala 1922'yan, ji bo daxwaza îmzakirina peymanek nû ya di şuna Peymana Sewrê, di navbera Kemalîstan Tirkîyê û dewletên hevpeyman de çêbû. Li vir de Lord Curzon ê nûnerê Britanya û îsmet înonû (Ismet Inönû) yê nûnerê Tirkîyê, bi du qolî ketin nav behsa çarenivîsa Wilayeta Musilê û heryek ji wan ber xwe ve hewil dan kû Kurdan bikin jokerê birina lîstika xwe.

Dema vê yeka han feyde neda û negihîştin netîceyek, Lord Curzon(24) ku wî wextî Wezîrê Derve ya Britanya bû, roja 25'ê Kanuna Duyem a sala 1923'yan, nameyek taybetî ji Sekretere Giştî yê Komela Gelan re şand û jê daxwaz kir da ku mesela Musilê têke nav lîsta kara Encumenê. Piştî vê, înonû naçar bû heta dereceyek hinek paş de gav bavêje. Ji ber vê, herdu alî bi hev re qerar dan ku vê mesela han di navbera neh mehan de bi xwe helbikin. Ger herdu alî di navbera vî wextî de nikaribin bigihîjin netîceyek, wê çaxê vê mesele bidin destê Komela Ge¬ lan.

Her çiqas nûnerê herdu milan çendîn civîn û mûzakere di vî warî de kirin jî, bê ku Tirkîye û Britanya Mezin bigihîjin netîceyek, roja 5'ê Hezîrana sala 1924'an, ev neh meh temam bûn. Dema ku kar gihîşt vê nuqtê, roja 6'ê Tebaxa sala 1924'an Londra ji Sekretere Giştî yê Komela Gelan daxwaz kir da ku bê paş de avêtin Mesela Musilê bêxe ber destê Encûmen, ll'yê meha Tebaxa eynê sala, yanî tenê piştî pênc rojan, di bin rêvebirîya karan komela de Mesela Musilê kirin nav lîsta kara En¬ cûmen û endamên komela, di vî warî de Tirkîyê agahdar ki¬ rin.

Unîversîta Indiyana ya Dewletên Yekbûyî yen Amerîkayê kir. Çend sal şun de çapa wê ya duyem jî hat weşandin. Ji bo lekolînê çend mi¬ lên girîng en dîroka hevdemî ya gele Kurd, serokanîyek heja ye.

*24) Lord Nathaniel Curzon (1859-1925) yek ji wan miroven sîyasî yen bi nav û deng en ingiltere ye, ji dawîyê sedsala 19'an heta dest¬ pêka sala 1924'an Wezîre Derve bû, bi vî awayî rola wî di "Mesela Mûsile" û çarenivîsa Kurdan de mezin bû.

Di civîna roja 30'yê Îlona sala 1924'an de, Komela Gelan biryar da ku Mesela Musilê bispêre komîtekê taybetî ya ji sê ke¬ san pêkhatî û mehek şun de jî navê wan bi vî awayî dîyar kir:
Yekem: Karbidestê wezareta derve ya Swêd, Einer af Wirsen ku li Romanya konsolos bû.
Duyem: Sîyasetvan û zanaye coxrafya, Paul Teleki, navek re serokwezîrtîya Macarîstanê kirîye.
Sayem: Zabitê (subay) teqawîd ê Belçîkî, A.Paulis.
Yê yekem, yanî Wirsen, bû serokê komîtê, hejmarek sekreter û alîkarên şareza jê re hatin dayîn.
Diviya ku komita Komela Gelan gişt wan belgên ku pey¬ wendîya wan bi milên cûda cûda yên jîyana netewî, civakî û aborî ya bi mesela Musilê ve heye, bikole. Her wiha hewce bû endamên wê biçin navçan cûda yên "Wilayeta Musilê" û di nêz ve peywendî li gel nûnerên grubên cur bi cur ên li wir rûdinin deynin, pist re kurtîya netîca kar û pêşnîyarên xwe di raporek serbixwe de pêşkêşî komela bikin.
Ji bo cîbicîkirina vî karî, endamên komîtê serî li Londra, Bexdad, Stenbol û Enqerê(25) dan û piştî vê, dawîyê meha Ka¬ nuna Duyem a sala 1925'an çûn navçan "Wilayeta Musilê".
Roja 27'ê wê mehê gihîştin bajarê Musilê bi xwe. Piştî çend rojan endamên komîtê û alîkarên wan cûda cûda çûn bajêr û qesebên din ên navçê, li Hewlêr, Kerkûk û Silêmanîyê bi taybetî man û bi gelek kesan re peywendî danîn. Meha Nîsanê veg¬ erîyan Cenevrê û li vir dest bi nivîsandina rapora xwe kirin.
Roja 6'ê Tîrmeha sala 1925'an dawî pê anîn û pêşkêşî endamên Komela Gelan û hejmarek rojnamevanan kirin.
Hêjayî gotina ye ku nênerên Tirkîyê û Britanya jî bi endamên

komîtê re hatin. Tirkên, aşkera ye ji bo armancên xwe û berê her tiştî jî ji bo xwe nêzîkkirina Kurdan, Fetah Begê xizmê Şêx Mehmud li gel xwe anîn.

*25) Roja 16'ye Kanuna Duyem a sala 1925'an endamên komîtê gihîştin Bexdade û piştî deh rojan,ji vir çûn Musilê û veca ketin gerîna navçen Kurdistanê.

Munaqeşe, biryar û mercan Komela Gelan ji bo dîyarkirina çarenivîsa "Wilayeta Musilê" heta dereceyek aşkera ye û têt zanîn. Em dixwazin di vê gotara de taybetî li ser vê rapora han a ku wê komîtê amade û pêşkêşî komela kirîye bisekinin û bal bikişînin ser ku navê wê wiha ye:

"Komela Gelan.

Mesela Sînorê Navbera Tirkîye û lraqe.

Ev rapor ji alîyê we komîtê ku li gor biryara roja 30'yê îlona sala 1924'an a ji alîye Encûmen de hatîye damezrandin, peş¬keşi Encûmen bûye"(26).

Rapora komita lêkolîna li ser Mesela Musilê, ji zanyarîyên gi-rîng yên di warê sîyasî, aborî, civakî û coxrafî pêkhatine ku beşek ji wan ji serokanîyên bi bawer wergirtine û beşa din jî, endamên komîtê bi xwe berhev kirine. Zanyarîyên vê beşa dawîyê, endamên komîtê yan bi çavên xwe dîtine û nivîsîne yan jî di riya hejmarek mamostên şareza yên unîversîtên bi nav û deng ên cîhana ve zanîne. Ji ber vê, ev rapor di yekem roja belavkirina xwe de bûye serokanîyek rojane ya lêkolîna gelek milên jîyana Kurdan ya nû û hevdemî. Kurdnasan gelek car di berhemên xwe de ji zanyarîyên vê rapora îstîfade ki¬rine.

Çi kesê ku bixwaze behsa jîyana derebegî, koçerî, eşayîrî,

peywendîyên aborî û 'urf û adetên civaka navçan fireh ên Kur¬
distanê bike, pêwîst e serî li naveroka rapora komita lêkolîna
mesela Musilê bide ku birek nêrînên sîyasî yên hessas tê de
ne... Hêjayî gotina ye ku nivîskarên rapora çend caran behsa
peywendîya biratîya navbera Kurd û îsayîyan kirine û vê
yeka han qebul kirine ku di vî warî de tu gelek din ê Musilman
nîne ku bikaribe bibe wek Kurdan(27).
Cardin gelek car navê Kurdan û Kurdistanê di wê rapora
taybetî ya hêja de heye ku îngilîzên di navbera salan 1920 û
(26) gva j^j, jj navg wð yg Ingilîzî ye :
(League of Nations. Question of the Frontier between Turkey and
Iraq. Report submitted to the Council by the Commission instituted by
the Council resolution of September 30, 1924), Geneva, 1925.
*27) ibid, PP. 46-47
100
1932'yan de, çend car bi awayê çapî derbarê kar û baran
îdarekirina Iraqê de pêşkêşî Komela Gelan kirine. Ev raporên
han jî îro bûne serokanîyên rojane yên lêkolîna dîroka hevdemî
ya hemû lraqê û gelek zanyarîyên bi feyde û girîng der¬
barê alîyên cûda yên jîyana Kurdan tê de hene.
Qismên serekî yên heryek ji wan raporan, ji bo Kurdan
amade kirine. Wek mîsal di rapora yekem de ku di derbarê
rêvebirina kar û baran lraqê yê navbera meha Çirya Yekem a
sala 1920'an û meha Adara ya sala 1922'an de ye(28), behsa
kuştina Mister Bil û Kapiten Skoti tê kirin. Ev herdu kes di
meha Kanuna Yekem a sala 1919'an de ji alîyê şoreşgeran Kur¬
dan navça çîyayî ya Hewlêrê ve hatibûn girtin. Her wiha
behsa kuştina Kapiten Salmon jî te de ye ku zabitê sîyasî yê

Kifrî bû û di destpêkî de ji alîyê Kurdan ve hat esîr kirin, pist re jî hat kuştin(29).
Eynê rapor bi kurtî behsa Kongra Cjahîrê û sîyaseta îngilîzên a hemberê Kurdan, beşdarnebûna xelkê Silêmanîyê li "helbijartina" Feyselê Yekem, kirîye. Ya yekem, yanî di Kongra Qahîre, meha Gulanê ya sala 1921'an de di bin çavdêrîya W. Churcill de civîya ku ew wê çaxê Wezîrê Kolonîyan bû. Endamên "Kongra Cjahîrê" di derbarê Iraqê de çar behsên serekî lêkolîne:
Yekem: kêmkirina vergîya Britanya Mezin li Iraqê.
Duyem: behsa wan kesen ku xwe ji bo texte paşatîya Iraqê amade kirine.
Seyem: Mesela Kurd.
Çarem; Rewşa eskerên Iraqê ye rojên peş (dahatû).
Her çiqas Kongra Qahîrê qîmetek zade da mesela Kurd jî lê guhertinek bi wî awayî di sîyaseta Ingilîzan a hemberê wan nehat holê.
Rûpelên 68 û 69'an ên vê rapora sala 1920-1922'yan, ji bo tefandina serîhildana Eşîreta Surçî ya dijî îngilîzên dagirker
(28) Report on Iraq administration, October 1920 - March 1922), London, 1923.
*29) Rojen "Şoreşa Bîstan"de Kapîten Salmon (Captain Salmon) ji alîye miroven Birahîm Xane Delo ve hat kuştin.
101
amade kirine. Ev serîhildana han dor û berê dawîyê sala 1921'an destpê kir, îngilzan heta destpêka sala hatî nikarîn bi tevayî wê serîhildana bitefînin. Li gor zanyarîyên vê rapo¬ra, hejmara şoreşgeran Surçî digihîştin 600 kesan ku wek di¬

bêje, nêzîkî 200 eskerên Tirkên bi topen xwe ve alîkarîya wan dikirin. Ew haza eskerî yên Ingilîzan berdan cana şoreşgeran Kurd, ji hezar eskerên lîwa pêk hatibû ku ji derveyê du zabitan pe ve yek ji wan Ingiliz nebûn. Wisa dixuyê şerê navbera herdu alîyan du roj ajotîye, Tirkên tenê roja yekem beşdarî ki¬rin û ji wir şun de şoreşgeran terk kirin. Li gor vê rapora piştî vê, Surçîyan, baş berxwedan, lê naçar bûn xwe paş ve bikişin. Wekî hatîye nivîsandin zerarê wan 20 kuştî, 70 birîndar, kavilkirina hejmarek gund û girtina du-sê kerî mî û bizin bûne.

Dawîyê vê rapora sala 1920-1922'yan de rastîyek dîrokî ya biqîmet hatîye weşandin. Dibêje, îlona sala 1921'an de, hej¬marek sereskerên şareza yên îngilîzên gihîştin Iraqê û destavêtin beşek piranîya hazên xwe yên girêdayê lîwaya navçan Firatê birin Kurdistanê. Lêbelê, "gelek mixabin heta dema nivîsîna vê rapora nikarîne qet yek eskerek lîwayê li Dîwanîye, Semawe û Nasirîye bileqînin", ji ber ku, wek dibêje, hemû melbendên Firatê bi esker nedihatin kontrol kirin. Ev gotinên han dereca belavbûna tevgera rizgarîxwazî ya Kurd a dijî Ingilîzan û qîmeta xebata bi hev re ya di nav sinorê yek welatî de bi aşkera ronî dikin. Rast e heta roja nivîsandina wê rapora, dagirkerên karîbûn Şoreşa Bîstan li Başûr û herêma navîna welat de bitefînin, lê, ew sê bajarên ku navê wan derbaz bûn hîn ji çeng û perrên xwe neketibûn, ji ber vê Ingi¬lîzan nekarîn hemû kûçiken xwe yên har berdin gîyana welat¬parêzan Kurdan.

Di eynî rapora de navê Şêx Mehmud, Simaîl Axayê Şikakî (Simko), Mehmud Xanê Dizlî, Ebdurrehman Axayê Serokeşîra Şirnaxî ya Kurdistanê Tirkîyê û hejmarek navdaren din

ên Kurd derbaz dibin(30). Wek mîsal derbare Şex Mehmud û Mehmud Xanê Dizlî yê mezine Hewramanan wiha dibêje:
*3°) (Report on lraq administration, October 1920 - March 1922), PP. 103.
102
"Li navça Silêmanîyê propagandayek gelek zade li dijî Bri¬ tanya kirîye.. Sala 1919'an Mehmud Xanê serokê gundê Dizlê, beşdarîya Tevgera Şêx Mehmud kir û sala 1920'an hukumeta Irana wî esîr girt û dan destê karbidestên Britanya (li Iraqê-K.M.). Piştî vê, demek li Hindîstanê girtî ma, îlona sala 1921'Yan îzna wî dan ku vegere Silêmanîyê, lê bi wê serte ku soz bide nece milê îranê. Lê. Mehmud Xan sozê xwe bicî nenanî, vegerîya Dizlê û ji wir namek ji Mustefa Kemal re şand, ji bo ji navçan Silêmanîyê derêxistina îngilîzên daxwaza çekan jê kir. Di Kanuna Yekem de hejmarek serokên mezin ên Hewraman ku bêguman peywendîya wan li gel wî hebû, hatin Deşta Helebçê û ketin berhevkirina baca. Nîvê meha Kanuna Du¬ yem (sala 1922-K.M.) hêzekê Lîwayê ket nav kemîna wan û hejmarek ji wan hatin girtin ku yek ji wan zabitê Britanya Kapitan Fîtzgîbbon(31) ê fermanda wê hazê bû. Piştî vê, Bri¬ tanya bi hazên xwe yên piyade û bi firokan (teyaran) ve êrîş kirin ser Helebçê. Netîca vê êrîşê gelek serkevtî bû. Mehmud Xan bi naçarî vegerîya gundê Dizlê, lê mirovên wî li ser êrîşa Deşta Helebçê neşikestin. Erîşên firokan ên meha Adara Mehmud Xan mecbur kir da ku peywendî bi karbidestên îngilîzên ve deyne.
Kesên ku beşdarê Şoreşa 1919'an a Şêx Mehmud bûn ev kes bûn: Şêx Qadirê biraya wî, Xerbîyê Şêx Arifê xizmê wî û Şêx

Ehmedê mirovê wî (ev di meha Gulanê de hat berdan). E ye¬
kem û duyem niha li Bexdayê ne, herçî Şêx Ehmed e rê dan ku
yekser vegere Silêmanîyê. Şêx Mehmud û Şêx Herbîyê kura
Şêx Maruf, di meha Kanuna Duyem de ji Hindîstanê anîn û
niha wek multecîyên sîyasî li Kuweytê ne û heviya vegerînê
ne ji bo Silêmanîye"(32).
Di cîyek din ê eynî rapora de, derbarê xwendevarîya wê çaxê
ya Kurdistanê de vê rastîya han daye dest; dibêje di îlona
sala 1921'an de sinifek navendî (orteoqul) li Silêmanîyê veki¬
lin, le, ji bo ku tenê sê xwendevaran serî lêxistibûn, pêşnîyar
*31) Captaîn Fitzgibbon
*32) (Report on lraq administration, October 1920 - March 1922), PP.
116-117.

kirin da ku biguherînin bajarê Kerkukê(33). Wek em ê di
dawîyê de jî behs bikin, xwendina Kurdî, di bin sîya îngilîzên
de, ji çaverîya ku jê dihat kirin jî kemtir pêşkevt.
Di raporên piştî vê de ku îngilîzên derbarê kar û baran lraqê
yên navbera Nisana 1922'yan û Adara sala 1923'yan dane Ko¬
mela Gelan(34), em bi dirêjî behsa rewşa Kurdan hemberê
"helbijartina" Feyselê Yekem, alozîyên navça Helebçê û
Hewraman, kuştina M.Mott (35), rewşên cûda yên serokên Caf
û Pêşder derbarê Şêx Mehmud de, aktîvîtên Kemalîstan di
nav Kurdan lraqê de, serîhildana Kerîm Begê Fettah Begê
Hemewendî, kuştina Kapiten Bond(36) û Kapiten Makkant(37)
ji alîyê şoreşgeran Hemewendê ve û gelek behsên hêja yen wek
van dixwînin(38).
Eynê rapor bi dirêjî behsa wê kirîye ku çawan di bin

serîhildana şoreşgeran û nerazîbûna xelkê de, îngilîz naçar bûn roja 5'ê îlona sala 1922'yan bajarê Silêmanîyê û hemû wan navçe û melbendên ku ketine Bakurê Hewlêr-Kerkuk-Kifrî berdin . îngilîzên wê rojê 67 karbidestên xwe ji Silêmanîyê bi firokan birin Kerkukê, rêvebirina kar û baran bajêr sipartin wê encumenê ya ku demek beri nûnerên danişîiwanên bajêr helbijartibûn(39).

Cardin eynî rapor bi firehî behsa çend alîyên girîng li ser vegerîna Şêx ji Hindîstanê dike. Di vir de rapor bi sernivîsa "Wergirtina Desthilata ji Alîyê Şêx Mehmud de û Planên Wî li Gel Tirkên", behsa peywendîya nihênî ya Şêx Mehmud di

03) Ibid.

*34) (Report on Iraq administration, April 1922 - March 1923), London 1924.

(35) Lieutenant M.Mott.

(36) Captain Bond

(3') Captain Makkant

(3g) ((Report on Iraq administration, April 1922 - March 1923)), PP. 33-34.

(39) Ibid, P.35.

104

riya Özdemir Paşa ve(40) li gel Kemalîstan kirîye. Di vî warî de vê rastîyê dibêje; Kemalist li gel Şêx dilpak nebûn, ji ber ku dixwestin wî bikin jokerê cîbicîkirina armancên xwe(41). Vê rapora gelek zanyarîyên heja di derbarê vê behsê û çalakîyên berfireh ên Kemalîstan di nav Kurdan lraqe de parasti ne.

Di çend cîyan de, rapora sala 1922-23'yan, bi aşkera behsa wan kirinan kirîye ku firokan serî yen Britanya di rikoya Şêx

Mehmud û Kemalîstan de, çi li danişтiwanê bêguneh ên Kur¬ distanê dikirin. Ez bawer nakim di wan deman de li tu quncekî din ên welatê berfireh ên bindestê îngilîzên de, bi rada Kur¬ distanê çekên cur bi cur, bi taybetî firoke, hatibin bikaranîn. Londra van karan han wek bûyerek tebî'î di raporên xwe yên taybetî de dixist ber destê dezga Komela Gelan û endamên wê. Eynî bi vî awayî xebata gelê Kurd, bi taybetî Tevgera Şêx Mehmud, gelek rûpelên raporên piştî van tejî kirine ku ji bo behsa kar û baran lraqê ji Nisana sala 1923'yan û heta Kanuna Yekem a sala 1924'an amade kirine(42). Di wan raporên de çend car behsa ji alîyên firokan Britanya Mezin ve bombebara-

(40) özdemir Paşa zabitekî (efser, subay) mezin e Tirkên û alîgire Mustefa Kemal bû. Özdemir naznave wî bû, navê wî bi xwe Elî Şefiq û xelkê Misre bû. Hezîrana sala 1922'yan şun de Kemalîstan li gel hezeke esker ve şandin Rewandizê. Özdemir, bi hezar û yek gotinên serîn en derew ve karî bû di nêz de peywendî li gel gelek serokê Kur¬ dan re deyne. Çalakîyên Özdemîr û alîkarîya wî li gel serokên Kur¬ dan û bi taybetî li gel Şêx Mehmud, bi tevayî îngilîzên bêzar kiribû. Özdemir, qasek şûn de naçar ma paş de bikişe. Eğer di wê rewşa alozî de Kemalîstan bi dilek pak alîkarîya Kurdan bikirana, wê bikaribûna cîyê piye îngilîzên bi tevayî bişemitînin. (Özdemir Paşa yê bi navê Özdemir Bey jî ku dihat nasîn yarbaya mîlîsan bû. Li ser navê Kemalîstan bi Şêx Mehmut re dizî li hev kiribû. Di Nisana sala 1923'yan de dema ku li hemberê îngilîzên mexlûb bû pena bir ber îranê-Werger)

*41) ((Report on lraq administration, April 1922 - March 1923)), P. 39.

*42) ((Report by His Britannic Majesty's Government on the admin¬

istration of lraq for the Period April 1922 - December, 1924)), London, 1925.
105
na Silêmanîyê, Helebçê û cîyên din ên Kurdistanê , kirine. Li gor rapora wan bi xwe, bombebarana roja 25'ê Gulana sala 1924'an xelkên Silêmanîyê naçar kirin ku bajêr terk bikin, wek dibêje; dema ku îngilîzên îşxal kirin, ji 20 000 nifusê tenê 700 kes tê de mabûn. Piştî du mehan vêca nîvê xelke bajêr dest avêtin vegera ser mal û avahîyên xwe, lê heta meha Çirya Duyem hejmara wan negihîşt wek berî(43).
Ji derveyê behsa rewşa Kurdan li Iraqê, rapora sala 1926'an (44) bi taybetî behsa Simko jî kirîye. Di vî warî de wiha di¬bêje:
Simkoyê Simaîl Axa : Dor û berê dawîyê meha Çirya Yekem Simkoyê Simaîl Axa yê serokê Eşîra Şikakan ku bi navê Sim¬ko têt naskirin, dijî Hukumeta Irana şoreşekê berpa kir, le di wî şerê ku nêzîkî Dîlman de qewimî bû de zora wî çû û bi naçarî bi sed mirovên xwe ve pena anî ber Iraqê û piştî vê bi riya Tirkîyê ve, nêzîkî Nehrîyê, ji sinor derbaz bû û hat navça Rewandizê ya ser Hewlêrê.
îran dawa li lraqê kir ku Simko bi dilî bidê, lê lraqê mil neda ber vê daxwazê, ji ber ku qanuna penaberîtî ya lraqê musa'eda paşvedana penaberan nedikir. Li gel vê jî Hukumeta lraqê ji bo axaftina li gel Simko û bi şertên ku Iran wî 'ef bike, re dan Irana da ku zabitekî xwe bişînin nav axa lraqê(45).
Ji bo mesela Kurd û gelek behsên din ên wî çaxî yên Iraqê, ra¬pora sala 1927an(46) di giringîya xwe de qet ji yên din kêmtir nîne.Vê çare behsa muzakera îngilîzên li gel Şêx Mehmud

hatîye pêş. Ji bo cîbicîkirina vê mebestê, Şêx Mehmud, Seyîd
*43) Ibid, PP. 32-33.
(44) ((Report by His Brittanic Majesty's Government to the Council of The League of Nations on the administration of Iraq for the year 1926)), London, 1927.
<45> Ibid, P. 27
(46) ((Rep0rt by His Brittanic Majesty's Government to the Council of the League of Nations on the administration of Iraq for the year 1927)), London, 1928.
106
Ehmedê Berzencî kirîye nûnerê xwe û şandîye Bexdadê. Nivîsarên vê rapora, Seyîd Ehmedê Berzencî bi "ajaweçîyê (problem, têkelhevker) Kurdistanê Başur"(47) nav kirine. Aşkera ye, dibe welatparêz û hemû mirovên dilsozên welatên xwe, li ba hemû zordar û dagirkerên ve her ajaweçî, serîhilder û mirovê xerab be!. Her bi vî awayî rapora han Sabir û Ebdullayê kura Kerîmê Fettah Begê Hemewendî jî bi eynî navî nav kirîye. Ew jî wan rojan de, li ser rêça bab û bapîrên (kalan) xwe, bi mêranî dijî dagirkerên rabibûn, ji ber ku wê deme, wek rapor bi xwe dibêje; tenê ew di saha xebat de mabûn û îngilîz qul û qul bi firoke, bi hazên xwe yên siwarî û bi eskerên xwe yên lîwaye ve duv wan ketibûn.
Rapora sala 1927'an bi kurtî çend milekê rewşa jîyana wan Kurdan xistîye ber destê Komela Gelan ku di netîca serîhildana mezin a Şêx Seîd de pena anîbûn ber Iraqê û wek dibêje; navça Musilê ji ber lehîya van penaberan bi carek têkel bû. Li gor gotina rapora, heta sala 1927'an tenê 450 kes ji wan penaberan di nav axa Iraqê de mane. Yên din tev vegeriyane

ser gundên xwe. Ji wan 450 kesan jî, nezîkî 150 kes li navça Zaxo, 250 ji wan li navça Dihokê û nêzîkî 100 kesan jî li nav Musilê û der û dorên wî de nişstecî bûn(48).

Di rapora sala 1931'an de(49), hejmarek eşîrên navça Behdînan dibin gawur û berazxwer(!) û li ser vê, firokan Britanya Mezin gelek bi "dilsozî" tên pêş, dikevin gîyana wan. Dawîyê de em rûpelek li ser behsa girtina Mamoste Tewfîq Wehbî ya

(47) Ibid, P. 24

Esle vê gotine wiha ye:

(The stormy Petrel of Southern Kurdistan)

"Petrel" tenê bi sere xwe melike piçûk e behra gelek dûr e, lê, ku bi gotina "storm" re bê bikar anîn, te menayek din û ji wan kesen gelek zîrek û xweşik re tê gotin.

(48) ((Rep0rt... on the administration of Iraq for the year 1927)), PP. 24-25.

*49) ((Report by His Majesty's Government in te United Kingdom of Great Britain and Northern lreland to the Council of the League of Nations on the administration of lraq for the year 1931)).

107

ji nîvê Nîsanê heta 30'yê Gulana sala 1931'an dixwînin(50).

Her wiha çi ev rapor û çi jî rapora sala 1930'an(51), çend carek behsa 6'ê îlona reş, ta berpabûna Serîhildana Şêx Mehmud, heta esîrgitin û şandina wî li Nasirîye dikin. Dema ku rapora sala 1931'an têt ser behsa Şerê Avbarik ku roja 5'ê Nisana sala 1931'an de qewimî, dibêje Kurd "bi azayetî ceng kirin, her çiqas êrîşa firoke û piyadan berdewam bûn jî, heta tarîtî ser wan de hat wan ber xwe dan û vêca paş de kişîyan".

Nivîsarên rapora, bê hîle û mezinkirin behsa wan nivîsîne ku

çawan firokan îngilîzên navbera du heftîyên borî de ketin pê Şêx û bê rawestandin dest li ser hilnedan, heta roja 20'ê Nîsanê mecbur kirin biçe milê din. Şex li wir gundê Pîranê kir bingeha xwe ya nû(52).

Piştî çend rûpelek din, rapora sala 1931'an behsa we dike ku çawan Ingilîzan li ser daxwaza Riza Şah hazên xwe yen tay¬ betî birin ser Mehmud Xanê Dizlî û dest li ser hilnedan heta roja 31'ê Gulana wê sale û esîr girtin, şandin Bexdaye(53).

Rapora piştî van ku ji bo navbera Kanuna Duyem û Çirya Yekem a sala 1932'yan amade kirine(54), wek ên din bêperwa gelek behsa "camêrîya" firokan şerê yên Britanya Mezin a dijî şoreşgeran Kurd ji Komela Gelan re kirîye(û). Ev "çîroka" han a xweş(û) ev car bûye gula serdestê bense û şeş rûpelên ye¬ kemin ên rapora jê re "amade kirine". Cardin rapor gelek bê¬ perwa behs dike ku çawan êrîşên firokan îngilîz ên li ser Kur¬ dan ji bo xatirê çava hêşîn ê pîlotek û alîkarvanê wî ku

(5°) Ibid, PP. 15-16

*") ((Report by His Mejesty's Government in the United Kingdom of Great Britain and Northern lreland to the Council of the League of Nations on the administration of Iraq for the year 1930)).

(52) ((Report for the year 1931)), PP, 16-17

*53> Ibid, P. 31.

*^4) ((Report by His Majesty's Government in the United Kingdom of Great Britain and Northern lreland to the Council of the League of Nations on the administration of Iraq for the period January to October 1932)).

108

"çeten" Kurdan wan esîr girtibûn, behs dike. Lê nivîsarên vê

rapora bi awakî rast vê yeka han jî rapor kirine ku çawan van "çetan" bi mirovayetî ji wan esîran re hûrmet kirin û piştî de¬mek azad kirin(55).

Yek ji wan raporên îgilîzan ên di salan 20'an heta destpêka salan sîyan ku di derbarê Iraqê de pêşkêşî Komela Gelan ki¬rine, ji behsa Kurdan bêpar nîne. Rapora dawîyê ku bere xelasîya sala 1932'yan li ser girtina lraqê ji bo endametîya Ko¬mela Gelan hatîye pêşkêş kirin, ji kurtkirina hemû raporên din pêk tê, ji ber vê qîmeta wê gelek taybetî ye(56). Em dixwazin ji vê rapora tenê yek nimûne bînin ku Xwedê ji wan re nehêle, bê hîle û derew behsa rewşa xwendin û xwendevarîya Kurdan a heta destpêka 30'yan dike, yanî heta dema ku Iraq bûye endama Komela Gelan. Di wê navê re ku goya Britanya Mezin, lraqê bi navê Komela Gelan îdare dikir, jîyana rew¬şenbîrî ya Kurdan gelek hêdî bi ser hev de dihat. Her çawan be gavên li navçan din dihatin avêtin ji gavên vir dihatin avêtin xirabtir bû. Gelek mixabin carên wisa hebû ku ew gavavêtinên ber bi paş de bûn ne ber bi pêş de. Wek nimûne, berê ku Şerê Cîhana yê Yekem destpe bike, hejmara xwendevarên dibistanên navîn li bajarê Silêmanîyê digihîşt nêzîkî 165 kesan, çi heye ku berî ku lraq bibe endama Komela Gelan û piştî 14 salan zehmetîyên di bin qeyyûmîya Britanya pêşkevtî de, ev hejmara han ket, bûlO kes. Ji vê jî xirabtir; cardin berê ku lraq bibe endama Komela Gelan, di bin sîya Britanya Mezin de hejmara hemû kesan ku dibistanên Kurdî de dixwendin, li gor hejmartina îngilîzên bi xwe, tenê ji 1545 kesan pêkhatibû. Çi heye ku berambere van de, 6 300 kesan dibistanên îsayîyan de

*55) Ibid, P. 3.

(56) (Special Report by His Majesty's Government in the United Kingdom of Great Britain and Northem lreland to the Council of the League of Nations on the progress of Iraq during period 1920 - 1931), London, 1931.

109

û 8400 kesan jî dibistanên Cuhîyan de dixwendin!!(57). Yanî ew ciwanên lraqê yên ku hejmara wan nedigihîşt ji sedî 3-4'ê Kurdan, ji pênc qat zêdetir mafê wan ê xwendinê hebû!!

Bi vî awayî çi belge di derbarê Kurdan de çûye ber destê Ko¬mela Gelan, bi durustî wêna rewşa nalebar a sîyasî, civakî û aborî ya Kurdan ji bo endamên kaşa ye, behsa wan zulm- sitem û bêmafîya Kurdan ji wan re kirin ku sebebê hebûna îngilîzên ve, nîra ser milê wan dibû didu. Rast e, car û caran dezgên Ko¬mela Gelan hinek rê dan Kurdan û heta wan nameyên ku we¬latparêzan Kurdan ji wan re şandine jî bê bersîv nehiştin (58), lê, bêguman, rewşa komela beramberê Kurdan qet tu rojê negihîştîye nîva wê sevîyê ku li gor naveroka programa xwe di¬viya bikira. Ev yeka han jî cardin rûyê rasteqînî yê Komela Gelan a wek jokerê destê dewletên mezin nîşan dide.

Madem wiha bû, wê deme mafê welatparêzan Kurdan hebû bi çavekî şik û rikoyî li Komela Gelan binêrin. Bêsebeb nebû Selam di şi'reke xwe ya sala 1933'yan de ku yekem car di ko¬vara "Hawar" a li Şama dihat weşandin de, belav bûye(59), navê Komela Gelan danîye "kotekî destî Mîster Henderson" ê Wezîrê Derve ye Britanya Mezin(60).

(57) pp 232-234, ((Special Report...)), her wiha binere; Ebdurezaq el-Hilalî, Tarîxu'l Te'lîm Fî'l-Iraq Fî'l-'Ehedî'l-Osmanî 1638-1917, Bexdad, 1959, rûpel: 181, M.Emîn Zekî, Tarixu'l Sulemanîyye we

lnhaîha, terceme: Muhemmed Cemil Bendî Rojbeyanî, Bexdad, 1951, rûpel: 205-210, El-'Alemu'l-'Erebî" (rojname) , Bexdad, 20 Kanuna Dawî 1931.
(58) Binere: ((Report... on the administration of Iraq for the year 1931)) PP. 18-19.
*5') Binêre: Hawar, sala duyem, hejmar: 22, 1 Tîrmeha 1933, rûpel: 7. Ev perça han yekem helbesta Selam e di Dîwana wî de (binere: "Dîwanî Selam", Bexda, 1958, rûpel: 1-4). Di dîwane de çend cîyeke helbesta nehatine çapkirin, lê, Hawar deqa wê wek esle wê belav kirîye.
*6°) Mebest A.Henderson (1863-1935) ê Wezîrê Derve ya Ingiltere ye. Ew ji sala 1911'an heta sala 1934'an Sekreterê "Partîya Karker" bû. Sala 1929'yan bû Wezîrê Derve, sala 1931'an dev jê berda, yanî dema Selam şi'ra xwe gotîye ew hîn wezîr bûye.
110
Selam, di eynî şi'rê de derbarê Komela Gelan de bi êş û nalîn wiha gotîye :
'"Esbetu'1-Umem, komelî gewre
Be peç û pena be fêl w dewre(61)
Be coş û kul bûy bo Kurdî hejar
Etgut em qewme ekem ristgar
Eđer rast ekey helî sûrrene
Bes bo siyaset helman perrêne
Terîq nabî to to çît pe eken
(Kutekî destî Mîster Hendirsin)
Selam, pişti vê plan û lîstikên Komela Gelan ruswa dike û cardin berê xwe didê û dibêje:
Le 'edaletekey eme deebe

Yaxu her şêwe w ûsulî xerb e
Komelî dro, cegey mekr û fen
(Kutekî desti Mîster Hendirsin)
Xo to wesî bûy eqwam bûn hefîw
Demî Kurdit kird be teley teqîw
Selam hîn jî pêş de diçe û Komela Gelan dike cîyê bingeha "fitne û hîlan" û kargeha "fesadî û ezîyetê", ji ber ku:
Le Silemanî Cadey Ber Sera
Be xwenavî Kurd awrişen kira(62)
Piştî dawîpêanîna behsê, bi vî awayê dilşewitî berê xwe dide Komela Gelan û gelek ji dil jê dipirse:
Çon 'aciz nabî lem xwen riştine
Le lay to helbet hiquq kuştin e(63)
Natirsî mejû le'netit biken
(Kutekî desti Mîster Hendirsin)
Hêjayî gotina ye, ev şi'ra Selam gelek zû dîqeta rewşenbîrên Kurd û yên bîyanîyan kêşaye ku her yek ji bo armancek qîmetê

(61) £ven han çen£j beytên helbijartî ji helbesten Selam in, ne hemû ne.

*°2) Selam, vê şi'ra han ji bo yekemin bîranîna şeşe îlona reş nivîsîye, yanî îlona sala 1931'an.

(63) Digot; 'Li ba te elbet mafdan kuştin e".

111

bi mesela Kurd didan. Ev şi'r wergerandine Frensî û Garabêtê Ermenî nusxek ji wê anîye Cenevre ji Komela Gelan re. Dema ku Minorskî di sala 1934'an de hatîye Silêmanîyê, wî jî nimûnek bi xwe re birîye. Her wiha bi taybetî ji ber ku di hel¬besta de êrîşek zade li ser 'Ecem û Irana heye, konsolosa îranê

ye li Silêmanîyê sûretek ji wê anîye Wezareta Derve li Tehranê(64).
Komela Gelan di zimanê Kurdî de cûda cûda hatîye binav kirin. Nivîskarên Soran jê re gotine '"Esbetu'l Umem" yan jî "Komelî Eqwam", nivîskarên "Hawar"ê û "Ronahî"yê gotine, "Civara milletan"(65).
Bedirxanîyan li du kovar û nivîsên xwe yên din de gelek ca¬ ran "civat" di şuna komel, komele û yekîtîyê de bikar anîne (66). Di wextê xwe de "Akademîya Zanyarî ya Kurd", kelîma "civaf'ê di şuna "neqebe" de jî pêşnîyar kir(67). Li gor bawerîya min ev pêşnîyara han di cî de ye, ji ber ku Xanî "civîn" ji bo "kombûn û girsên xelkê bikar anîye", Cîgerxwîn û Qanadê Kurdo jî eynê gotina bikar anîne.
Ez emîn im germek kur û fireh di nav paşdemayîyên weşan û belgên Komela Gelan de, dê bikaribe hin rûyên din ên bi qîmet ên dîroka me ronî bike.
(64) ye beşe han di dîwana xwe de çap nekiriye.
(65) şj-j-g Selam di Haware de bi sernave "Ji bo Civata Milletan" û di dîwana wî de bi sernavê "Bo Komelî Eqwam" hatîye belav kirin.
(66) yvek mîsal binere: Hawar, sala: 1, hejmar: 2, 1 Hezîrana 1932, rûpel: 1, Sal: 1, hejmar: 14, 31 Kanuna Yekem 1932, rûpel: 1.
(67) Binêre: Kovarî Korrî Zanyarî Kurd, cilda yekem, beşê yekem, 1973, rûpel: 521.
112
MIJARA HEFTAN
ÇEND BELGE JI DÎROKA KURDISTANE
Wextê xwe de di hejmarek "Kovarî Korrî Zanyarî Kurd" de, van kurtegotarên han ên xwarê min bi navê xwe belav kirin(l).

Ji ber hêjatîya mijara wan ji bo rewşenbîrîya Kurd, ez di vir de bi destlêdanek kêm cardin belav dikim.

Yekem

WEQlFNAMA EBDURREHMAN PAŞAYE BABAN

Ebdurrehman Paşaya kura Mihemmed Paşaya kura Xalid Paşa, yek ji wan fermanrewayê bi nav û deng ê Mîrnişîna Ba¬ban e, sala 1204'e koçî (1789/1790'ê zayînî) desthilata kir destê xwe û di navbera çarîk sedsalek de, ne tenê li Kurdista¬nê, belko li Iraq, Iran û Tirkîyê, di jîyana sîyasî de rolek me¬zin lîst. Her wiha yek ji wan serokê Kurdan e ku hestê netewî tê de tê dîtin.

Li gor gotina Rîch, dema ku Silêmanê Biçûk ê Paşaya Bex-

*) Kovarî Korrî Zanyarî Kurd, cilda yekem, beşe yekem, 1973, rûpel; 381-418.

daya li dijî dewleta serîhilda, Sultan daxwaz ji Ebdurrehman Paşa kir ku cîyê wî bigre, lê, Paşaya Baban qebûl nekir ji Kur¬distan û bingeha Mîrnişîna bab û bapîrên xwe dûr bikeve.

Deqa gotina C.J.Rîch di vî warî de wiha ye :

"Dema Kûçûk Sileman Paşaye Bexdaye dije Deriye Bilind (2) serîhilda, Reis Efendi ku ji Stenbol ji bo tefandina ve serîhildana hatibû, serokatîya Hukumeta Bexdaye ji Ebdur¬rehman Paşa re peşnîyar kir. Le, Pire Mezin gelek bi şerane we şerefe red kir û vnha got : 'Rast e, ez bi vî karî dibim rvezîr, le dilopek ava befra çîyayen min hemû rezen împaratorîye tine. Ji derveye ve, çûna min li Bexda dibe sebebe zedebûna senvet û samanen min, le, ev kare min dibe sebebe tekçûna hemû binemala

Bebe"(3).
Yek ji wan belgên din ên hestê zanistî û netewî yê Ebdurreh¬
man Paşaya Baban ev bûye ku heta roja dawîyê jîyana xwe(4)
bi çavekî rêz û xoşewîstî li zanayên Kurdistanê nêrîye. Di vir
de em ê belgek dîroka yê ku nayê zanîn bixin li ber çav.
Yek ji wan destnivîsa sipehî ya ku ji bo Kitêbxana Ebdurreh¬
man Paşa nivîsandîye, "Sehîhê Buxarî" ye. Ev destnivîsa han
dawîyê meha Remezana sala 1211'ê koçî (Nîsanê 1797'ê
zayînî)(5) ji alîyê Mihemmedê kura Şêx Yusifê kura Şêx Mewlanayê
kura Şex Ömer ve ku nevîyê (torinê) Weysî Qerenî ye,
bi xetekê xweşik nivîsandîye û du cîyên wê de muhra Ebdur¬
rehman Paşa li ser e. Paşaya Baban vê destnivîsa han li ser
binemala Celê ya Koya û piştê wan jî li ser zanayên "Kurdis-
*) Derîyê Bilind, rasterast di mana "el-Bab el-'Alî" de ye, ku
heta dawîyê Şerê Cihana ye Yekem ji Dewleta Osmanî re dihat go¬
tin.
* ' C.J. Rich, Narrative of a Residence in Koordistan, and on the
site of Ancient Nineveh, with Journal of a voyage down the Tigris to
Bagdad, and an account of a visit to Shirauz and Persepolis, Vol, 1,
London, 1836, pp, 96-97.
*) Ebdurrehman Paşaya Baban, sala 1228'e koçî (1813'yê zayînî)
koça dawîyê kir.
*) Mixabin roja temambûna nivîsandina destnivîsa dîyar nekirîye.
114
tan, ji Musilê heta Bexda û Sine" weqif kirîye(6). Li ser muhra
Ebdurrehman Paşa ev hatîye kolandin :
"We ofeivtvevo emri îlallah 'ebduhû Ebdurrehman"(7).
Duyem

DU NAMEN HACÎ KAK EHMEDE ŞEX
Û RASTKIRINEK

Hacî Kak Ehmedê kura Şêx Marufa ji gundê Nodê û kura Şêx Mistefayê kura Şêx Ehmed, yek ji wan mirovên zana yên payebilind ê Kurdistanê yê sedsala I9'an e. Hacî Kak Ehmed, sala 1207ê koçî (1793'ê zayînî) li bajarê Silêmanîyê ji dayîk bû û sala 1305'ê koçî (1887'ê zayînî) her li wir koça dawîyê kir.

Vêca niha em dixwazin şaşîtîyek biçûk a di derbarê temenê Hacî Kak Ehmedê Şêx de rast bikin.

Li gor van salan jorîn, Hacî Kak Ehmedê Şêx 94 salîya xwe de wefat kirîye. Lê çi heye ku Mamoste Emîn Zekî û Şêx Mihemmedî Xal nivîsandine ku dema wî zanayê me koça dawîyê kirîye temenê wî 98 sal bûye(8).

Ev şaşîtîya han ji vê yeka han tê ku dîroknivîsê me yê mezin Mamoste Emîn Zekî temenê Hacî Kak Ehmedê Şêx li gor salnama salan zayînî hesêb kirîye bê wê ku ferqê deh rojên salan bigre berçav. Mamoste Şêx Mihemmedî Xal jî her çendîn sala ji dayîkbûn û wefata Hacî Kak Ehmed wergerandîye ser salan zayînî û bi awakî rast sala dayîkbûnê 1793 û wefatê jî 1887 ' ' Deqa wê ya Erebî bi vî awayî ye: "...Summe 'elel 'ulemaî'llezîne kanû fi nahîyetî Kurdistan mîn e'1-Mûsil îla Bexdad we Senendej..."

*) Binêre: wênên weqifnamên Ebdurrehmah Paşaya Baban, rûpel: 383 û 385, hejmara yekem a Kovarî Korrî zanyarî Kurd.

*) Binêre: M.Emîn Zekî, Meşahîru'l Kurd we Kurdistan, el-cuz'i sanî, Qahîre, 1947, rûpel: 119.

M.Emîn Zekî, Tarîxu'l Silemanîyye we Enhaîha, Bexdad, 1951, rûpel: 224.

Mihemmed el-Xal, el-Şeyx Me'ruf El-Nodehî El-Berzencî, Bexdad,

1961, rûpel: 199.
115
tespit kirîye, lê li gel vê jî temenê wî 98 sal nivîsandîye.
Tesîreke hêja yê Hacî Kak Ehmedê Şex di zanistîya ayînî de heye û gelek nivîsên vî warî bi zimanê Farisî di pê xwe de hiştîne. Eynî wextê, Hacî Kak Ehmed, di nêzik de peywendî li gel zanayên Kurdistanê danîye. Yek ji van zanayên mezin Hacî Mele Ebdullayê Celîzadeyê Köye ye. Wisa dîyar e bi berdewamî name di navbera van herdu miroven mezin de çûye hatîye. Binemala Celîzade ji van naman du lib parastine ku di wextê xwe de Hacî Kak Ehmedê Şex ji mele Ebdullah re şandîye.
Gelek mixabin li ser tu cîyek van herdu naman roj û sala şandina wan nenivîsandine(9). Lê, wisa dîyar e ku yek ji wan sala 1300'ê koçî (1882'ê zayînî) ji Silêmanîyê şandine Köye.
Ya diduyan jî ji naverok û lawazîya xetan derdikeve ku de¬mek kurt berê koça dawî ya Hacî Kak Ehmedê Şêx hatîye nivîsandin(lO). Di destpêka vê de Hacî Kak Ehmed wiha nivî¬sandîye:
"Ya hebîbî, we ya qerîbî we ya muhibbi, îbteleytu bîma xerece mîn taqetî we bîma la sebre li fîhî we etemenna meiatî me'e hûsne xatimî fe'izurnî. Eczeytekum bil tedris la sîyema kûlle 'îbade lîsanîyye cuz'îyye kullîyye, we kûlle 'îbade fi'lîyye..."
Seyem
ÇEND RASTÎ DI DERBARE ŞAIRE
BI NAV Û DENG ŞEX RIZAYE TALEBANÎ DE
Şairê mezin û heja yê dawîyê sedsala 19'an heta destpêka

sedsala 20'an a Kurdistanê, Şêx Rizayê Talebanî, di edeba gelê Kurd de xwedî cîyek bilind û aşkera ye. Lê çi heye ku li gel vê jî heta niha di dîyarkirina sala ji dayîkbûn û wefata wî de ferqîtî heye. Mamoste Emîn Zekî behsa sala ji

*) Binêre: wênên wan herdu namên rûpela 388 û rûpelek din a bê hejmar a hejmara yekem Kovarî Korrî Zanyarî Kurd.

*) Mamoste Mes'ud Mihemmed jî di vî bawerîya de ye.

dayîkbûna wî nekirîye(ll). Herçî Mamoste Elaeddîn Seccadî ye sala 1835'an(12) û Dr.Maruf Xeznedar jî sala 1832'an sala ji dayîkbûna wî nivîsandine(13).

Kurdnasê derve jî van salan han bi tevayî dîyar nekirine. Wek mîsal Edmonds nivîsa xwe ya yekemin a derbare Şêx Riza de du salan ji bo ji dayîkbûna wî nivîsandîye; 1841 yan 1843(14). Lê, çi heye ku piştî demek, navbera van herdu salan bijartîye û sala 1842'an kirîye sala ji dayîkbûna wî(15).

Dr. Kemal Fuat rasterast 1253'ê koçî sala ji dayîkbûna Şêx Rizayê Talebanî nivîsandîye(16). Lê wisa dixuyê ku roj û meh jê re nedîtîye ku heta bikare bi temamî vê sala han li gor salnama zayînî dîyar bike, ji ber ku sala 1253'ê koçî ber sala 1837/1838'ê zayînî dikeve. Dr. Kemal Fuat ji van herduyan yekê bijartîye, wisa dixuyê bi vî awayî xwestîye hinek teme¬ nê vî şairî me yê mezin direj bike. Ez buma jî min her wiha di¬ kir.

Mamoste Mela Ebdulkerîmê Mûderris, 1253'ê koçî wek sala ji dayîkbûna Şêx Riza Talebanî danîye. Wî, ji bo dîtina vê sala serî li Şêxê Telebanîyan daye(17).

Şêxê mezin Talebanî, li gundê Qirx ê nêzîkî Çemçemalê(18) ji

*) Binêre: M.Emîn Zekî, Meşahîru'l Kurd we Kurdistan, cuz'i ewwel, Bexdad,1945, rûpel: 224-225.
*) Elaeddîn Seccadî, Mejûyî Edebî Kurdî Bexdad, 1952, rûpel: 341, çapa duyem, Bexdad, 1971, rûpel: 374.
*) Dr.Maruf Xeznedar, Kurtey Mêjûyî Edebî Kurdîy Nwê, bi zim¬ anê Rusî, Mosko 1 968, rûpel: 81 .
*) C.J. Edmonds, "A Kurdish Lampoonist Shaikh Riza Talabani", Journal of the Royal Central Asian Society, London, Vol XXII, January 1935, p. 116.
*15) C.J. Edmonds, Kurds, Turks and Arabs, London, 1957, p. 57.
*16) Kamal Fuad, Kurdische Handschriften, 1970, p. 101.
*) Biryar wisa bû ku Mamoste Mela Ebdulkerim ve rastîya han di Yadî Merdan de çap bike.
* ' Qerx û Taleban du gund in û dikevin navça Çemçemalê ya nav¬ bera Kerkûk û Silêmanîyê.
117
dayîk bû. Temenê wî yê zaroktîyê li Kerkukê derbaz bû. Li Kerkûk, Köye û Silêmanîyê xwendîye; erebî, farisî û tirkî baş zanîye û şiir nivîsandîye. Çûye Stenbol û beşê dawî yê jîyana xwe li Bexdad derbaz kirîye.
Gelek mixabin di weşana sala wefatkirina Şêx Riza de car¬ din şaşîtî hatîye kirin. Mamoste Elaeddîn Seccadî, 1909'an wek sala wefata wî nivîsandîye(19). Dr.Kemal Fuad jî eynê sala nivîsandîye(20).
Gorra Şêx Riza, tijî nûr û gulav be, li Goristana Şêx Ebdulqadirê Geylanî ya li Bexdayê de ye(21). Li ser kela mezin a gorra Şêx Riza wiha hatîye nivîsandin:
"Qed fewefîyye el-fadilu'l-merhûm fi leyletî'l-cum 'e'l-mubarek

min Muherremî'l-Heram, sene: 1328".
Yanî di vê belga han a girîng de, heta meh, heftê û şeva koça dawî ya Şêx jî heye. Lê, Mamoste Emîn Zekî vê roja han yekê Muherremê nivîsandîye(22). Ji ber ku yekê Muherremê, roja pêncşembê tê hesêb kirin û li ser kala gorra wî jî nivîsandîye ku Şêx şeva Inê wefat kirîye, ez di wê bawerîya de me ku yekê Muherrem a Mamoste Emîn Zekî durust be. Bi vî awayî roja wefata Şêx Riza Telebanî wiha dibe:
Yekê Muherremê sala 1328'ê koçî ku dike avara pêncşembê ser îna 13'e Kanuna Duyem a sala 1910'an.
Li ser kala gorra Şex Riza bi Farisî ev çend rêzên han hatine kolandin:
Ya Resulellah çe başed çon sege Eshabekehf
Daxile Cennet şevem der zûmreye eshabe to
U reved der Cennet û men sege eshabe to
U sege Eshabekehf û men sege eshabe to
*) Elaeddîn Seccadî, serokanîyê ku navê wê derbaz bû, çapa ye¬kem, rûpel; 341-343, çapa duyem, rûpel; 374-376.
*20) Kamal Fuad, Op. , p.101.
*) Mihemmedî kûre şex Reza, ku ew jî şair bûye û naznavê wî "Xalis" bûye, li teniste baba xwe û di Goristana Şêx Ebdukjadirê Gey¬lanî de hatîye veşartin.
*) M. Emîn Zekî, Meşahîru'l Kurd we Kurdistan, cuz'i ewwel, rûpel: 225.
118
Şêx Rizayê dinyadîtî û jîyanperest, bi peywendî û runiştina bi zana û şairan re gelek hez dikir û peywendîya wî bi gelekan re hebû. Yek ji heval û dosten wî ye herî nêzîk Mele Ebdullahê

Celîzade bûye ku bi hev re li Köye li ba Hacî Mele
Eshedê baba Hacî Mele Ebdulla xwendine û piştî vê jî di riya
naman re peywendîya wan bi hev re dom kirîye. Yek ji namên
Şêx Riza ku heta niha jî maye(23), ji nivîsînek dostane pêk¬
hatîye. Şêx Riza vê nama han di sala 1313'yê koçî (1895/
1896'ê zayînî) de nivîsandîye(24) Şêx bi vî awayî bi rêzên
şiîrên xwe yên farisî ve dest bi nama kirîye:
'Eyb der zate to ey kani hûner me'dum est(25)
Meðer în'eyb ke lehme 'ulema mesmum est
Şi're men ez hewe sû der heme keşiver sari
'Ilme to der heme ca ber heme kest me'lûm est
Mîreved şi're men 'ilme cihangire suma
Herdo bîfaîde ta caye eqamet Rûm est
Name binvîs be her terz diletmîxwahed
Hemî sehr est eðer nesr o eðer menzum est
Roja 6'ê Kanuna Yekem a sala 1984'an, kak Çalak Talebanî
vê mesela han ji min re got:
"V/enekeşeke Bexdaye, deng û behse Şex sehkirîye, her ji
dûr ve bûye heyrane eqil û zîrekîya wî. Daxwaz ji nevîye wî
dike çi kes e ku ji Talebanîyan bikare tesmîra ser û çaven wî
bike, ku dema te Bexdaye bine li ba wî. Qasek şun de wî hunermendî
weneke cenabe Şex durust kir ku çawan çave dapîra
min le ket, ecebmayî ma û yekser pirsî: *ev rvena mame (ape)
te Riza li ku bû', eynî ew bi xwe ye!".
(23)
v Binêre: wêna we nama ku di rûpela 392'an a hejmara yekem a
Kovarî Korrî Zanyarî Kurd de ye.
*) Mixabin di nama de tenê sala şandinê hatîye nivîsandin.

(25)
v ' Şewa nivîsîna Şêx Riza wek we hatîye parastin.
119
Çarem
CARDIN ROJNAMA "KURDISTAN"
Çendîn car di derbarê rojnama Kurdistan de bê nivîsandin hîn kem e, ji ber ku ev rojnama han destpêkeke dîrokî ya girîng û pirr şanazî ye di seranserî jîyana rewşenbîrîya gelê Kurd de(26).
Wek aşkera ye rewşenbîrên Kurd li dor û berê dawîyê sedsa¬ la 19'an ve bi germî têkelê nav xebata netewî ya gelên xwe bûn û her di wan rojan şûn de jî bi qîmeta rojnamegerîyê gihîştin. Bi taybetî ewên ku li Stenbol jîyabûn yan xwendibûn, bi çavên xwe dîtibûn ka rojnamegerîyê Tirk û yên gelên din di nav dew¬ leta Osmanî de çi rolek di jîyana civakê de dilîst(27). Vê yeka han nêzîkî dawîyê sedsala borî pal da ber xwendevanên dûrbîn ên Kurdistanê(28) da ku xwe ji bo weşandina rojname û kovarên bi zimanê xwe yê zikmakî amade bikin.
Cîbicî kirina ve wezîfa han a pêwîst ne li nav axa Kurdista¬ nê bi xwe û ne li Stenbola paytext, ji ber sebebên rejîma xwînavî ya Sultan Ebdulhemîdê Duyem (1876-1909) karekî rehet
* ' Di wê kiteba min de, ku bi navê 'Tegeyîştinî Rastî û Şwenî le Rojnamenûsî Kurdî" sala 1978'an de, hat belavkirin, min istifade ji beşekê ve behsa han kir.
(27) yekemin rojname di dîroka Tirkên de sala 1825'an bi zimanê frensî li Izmîrê hatîye çapkirin. Yekemin rojnama bi zimanê tirkî jî bi navê Takvim-i Vakayi sala di 1832'an de hatîye çapkirin, ku or¬ gana Derîyê Bilind bû.

Salen 70'yên sedsala 19'an rojnamegerîyê Osmanî bi carek berbipeş de çû û hejmarên hemû rojname û kovarên vî welatî gihîştin 47 liban, ku 13 ji wan bi tirkî û yên din p erebî û yunanî yan bi zimanên din bûn. Çend lib rojnamên tirkî yên wek Tercûman-i Ahval û 'Tasvir-i Efk¬ ar û hinekên din di nav xwendevarên Kurdan de jî belav dibûn. U»; gj taybetî rewşenbîrên ser binemala Bedirxanîyan ku hejmara wan zade, dereca xwendina wan bilind, imkanên wan ên aborî û hebûnên wan baş bûn.

120

nebû, bi taybetî di wan rojan de di her quncek Kurdistanê de herroj serîhildanek berpa dibû. Ji ber ve rewşenbîrên Kurd naçar bûn hewil bidin li derveyê welat rojnamekê Kurdî çapbikin û ji wir jî bi dizî bigihînin Kurdistanê. Di wê serdema de ji bo dencistina rojnamekê wiha baştirîn cî jî Misir bû. Ji ber ku ev welatê han ser dema Mihemmed Elîye Mezin (1805-1849) ji çengê desthilata Sultanên Osmanîyan rizgar bibû. Ji derveyê vê Ingilîzan ber bi xelasîya sedsala 19'an bi temamî cîyê pêyên xwe li Misrê qahîm kiribûn, hez jî dikirin ku nahezên dewleta Osmanî li wir bicivin. Nabe em eva han jî ji bîr bikin ku rojnamegerîyê Misrê ya wî çaxî deng dabû, hejmarek çapxanên mezin wî çaxî li Qahîrê kar dikirin, nahezkeren Derîyê Bilind ê Osmanî û textê tawîsê Qacarî li wir çapemenîyên xwe derdixistin.

Hemû ev sebebên han pal dan ber Bedincanîyan ji bo daxwaza weşandina rojnamekê kurdî berê xwe bidin Misrê. Bi vî awayî roja Pêncşembê 30'ê Zulqe'de ya sala 1315'ê koçî, /9'ê Nîsanê sala 1314*ê Rumî ku dikin 22'yê Nîsanê sala 1898'ê zayînî, li bajarê Qahîrê yekemin hejmara yekem rojname di

dîroka gelê Kurd de li çapxana El-Hîlal bi navê Kurdistan ji alîyê Mîqded Midhet Bedirxan ve hat derxistin.
Hêjayî gotina ye ku li gor wan cedwelên bawerîpêkirî yên li ber destan, bi taybetî cedwela Akademîya Orbelî(29), roja 30'yê Zulqe'de ya sala 1315'ê koçî dike roja înê, ne pêncşembê, wek eva han li du cîyan de li ser hejmara l'ê ya Kurdistan hatiye çapkirin. Li gor eynî cedwela, roja 30'yê Zulqe'de ya sala 1315'ê koçî dike 22'yê Nîsanê sala 1898'ê zayînî. Ji ber vê jî em awakî rast ji guherandina Orbelî dilxweş in(30). Bi taybetî ji ber ku şaşîtî di wê de bû ku Prof. Tsîbulskî di wan lîstên girtibûn de, ne behsa sala 1315 û ne sala 1316'an tê de nebûn (31), em naçar bûn bikevin gerîna wê ka gelo 22'yê Nîsanê sala
(29)
v ' Sala 1961'an li Moskova çap kirîye.
*) Binêre: rûpela 269'ê cedwela wî.
(31)
v ' Binêre: kovara Gelên Asya û Afrika, bi zimanê Rusî, Moskova, hejmar: 3, sal: 1962, rûpel: 245.
121
1898'ê zayînî dike roja pêncşembê yan roja înê. Piştê lêkolînek fireh derket ku ev roja han roja pêncşembê ye. Ger wiha be, dibe ku şaşî dîyarkirina destpêk û dawîyê mehên wê sala yen hicrî bi xwe de kiribe ku ew jî mimkun e. Ji ber ku wek tê zanîn, dîyarkirina destpêk û dawîyê salan hicrî li ser esasa dîtina hîvê ye û gelek caran şaşîtî tê de tê kirin. Ew roja 22'yê Nisana sala 1898'an li Misrê, 30'yê Zulqe'de hatîye nivîsandin, wisa dixuyê ku di rastîya xwe de 29 bûye. Eynê şaşîtî di hejmarên 3 û 5'e "Kurdistanê" de jî hatîye kirin, divê ji wan 28'ê

Zulhecca Yekem 27 û 27ê Muherremê Duyem jî 26 be.
Rojnama hêja û yekemin, Kurdistan, demek çend sal bi mu¬
haciri jîyaye û her rojek li bajarek hatîye çapkirin, hejmarek
li Cenevre ya paytextê Swîsr (isviçre), hinek li Londrayê û
beşek din jî li bajarê Folkston ku dikeve Başûrê Britanya, ha¬
tine çapkirin. Piştî Şerê Cîhana yê Yekem Kurdistan bûye
navê kovarek nû ya ku li Stenbol dihat çapkirin(32).
Beşek ji hejmarên rojnama Kurdistan, di kitêbxanên mezin ên
derve de hatine parastin. Hejmara yekem di Kitêbxana Liqa
Unîversîta Rojhilatnasî ya Sovyetê ya li Lenîngradê de heye,
hejmara yekem û heta 31'an -ji derveyî hejmarên 10,12, 17, 18
û I9'an- di Kitêbxana Marburg ya Almanya Rojava de hatine
parastin(33). 18 hejmarên ku sala 1899'an hatî çapkirin di Kitêbxana
Niştimanî (Milli Kûtûphane-Elîşêr) ya Enqerê de ne
(34).
Sala 1972'an li Şama bi rîya Rewşen Bedirxan ve hejmara
5'an a Kurdistan û rûpelên 3 û 4'ên hejmara 3'an ketin destê
*) Tenê di hêla nav de nebe qet peyvendîyek we bi rojnama ye¬
kemin a Kurdî Kurdistan re tûne. Li vir Mamoste Emîn Zekî û M. Elî
Ewnî ber bi şaşîyê de çûne. (Binêre: M. Emîn Zekî, Xulasetu Tarîxu'l
Kurdî we Kurdistan, Qahîre, 1936, rûpel: 370).
*) Kurdistan yekemin rojnama Kurdî 1898-1902 ye ku berhevkiriye
û je re pêşgotin nivîsandiye: Kemal Fuad, Bexdad, 1972.
Kovara Rûnakî, Bexdad, hejmar: 180, 23'ê Gulana 1969'an, rûpel:
4.
*) Binere: Eski Harfli Tûrkçe Sûreli Yayinlar Toplu Katalogu,
122
min û min wan li gel wêna hejmara yekem pêşkêşî Kitêbxana

Korrî Zanyarî Kurd kir.
Di bin navê hejmara yekem a Kurdistan de ev rêza han a Tirkî hatîye nivîsandin:
"Kûrtleri iqaz ve tahsil-i sanayiye teşvik içun şimdilik, onbeş gûnde bir neşrolunur Kûrtçe gezetedir". Lê, di bin navê hejmara 5'an de bi kurdî wiha nivîsandîye:
"Panzde roja de carkî têt nivîsandin cerîdeya Kurdî ye"(35).
Ji bo dîroka rojnamegerîyê kurdî hêjayî gotina ye ku li ser milê rasta hejmara yekem a rojnama kurdî ya yekemin, ev bi¬ryara han a gelek heja û bi mana hatîye weşandin:
"Her car du hezar cerîdeya be pere ez e rekim Kurdistanê de biden xelke(36) "
Piranîya herî zade hejmarên Kurdistan ji bo behsa girîngî û hêjabûna xwendin û xwendevarî ye, hemû rêzên wê bi awakî dilsozî ji bo ku gelê Kurd jî wek gelên din dest bavêje xwendinê, hatine amade kirin. Di vî warî de ji bo bilindkirina hestê xelkê gelek hedîsên pêxemberê Musilmanan en derbarê pêwistîya fêrbûn û xwendinê de nivîsandîye. Ji derveyê vê, çend nimunên din ên bi alîkarîya zanistîyê serkewtina Japon ser Çînê û ya Misrê p ser Sudana daye.
Hejmara 5'an a Kurdistan ku li Kitêbxana Akademîya de hatîye parastin, pêncşembê 27'e Muherrema(37) sala 1316'ê koçî (18'ê Hezîrana sala 1898'ê zayînî) çap bûye. Bi vî awayî Mîqded Midhed Bedirxan navbera du salan de pênc hejmarên Kurdistan li Çjahîrê weşandîye.
Hejmara 5'an a rojnama Kurdistan li ser kaxezek rengê kesk çap bûye. Dirêjahîya ve hejmara li gel wan perên hejmara si-
*) Wergirtinen ji rojnama Kurdistan bê destlêdana rênivîsa wan

hatine weşandin.
(ib) qj hejmara 4'an a Kurdistan de, hinek guhertin di ve rista han de hatîye kirin û wiha bûye: "Her car du hezar cerîdeya ez ê rêkim Kurdistanê de belaş biden xelkê".
*) Wek me di peş de got, mimkun e ev 27'ê Muherremê, di rastîya xwe de 26 be.
123
siyan ku destê me de ne, 33,8 û panîya wê jî 26 cm. e. Sergotara hejmara sayem bi Tirkî û bi vê navî namek ji Sultan Ebdulhemîd re şandîye : "Şevketlu 'Azîmetlu Sultan Abdulhamid Han-i Sani Hazretlerine" yanî "Ji Sultan Ebdulhemîd Xane Duyem e Mezin û Payebilind re". Dawîyê nama ku vê nama seranserê rûpela yekem û ya diduyan jî girtîye, bi îmza Mîqded Midhed bi vî awayî qedîya ye: "Bedirxan Paşazade Miqdad Midhed Kullari". Mîqded Midhed Beg di nama de ku duyem name ye bi rîya Kurdistan re ji Sultan re dişine, bi awakî xurt û vekirî armanca rojnama Kurdistan xistîye ber çav û daxwaz ji Sultan kirîye ku riya belavbûna wê bide. Ji ber vê yekê di rûpela sayem a eynê hejmara de pêşnîyarî ji bo zana, mîr û axayên Kurdan kirîye ku bi telgrafan daxwaz ji Sultan Ebdul¬ hemîd bikin da ku rê bide Kurdistan bila bi aşkera bê nav axa welat. Ev yeka han jî beguman çarçova xebata rewşenbîrên Kurdan wî çaxî û awayê rêbaza xebata wan nişan dide.
Hêjayê gotina ye ku li ser hejmara yekem û heta hejmara sayem a Kurdistan wiha hatîye nivîsandin: "Li Misrê Metbe'a el-Hîlal de teb' bîye", çi heye di dawîyê hejmara 4'an û 5'an de wiha nivîsandîye "Li Misrê Metbe'a(*) Cerîdeya Kur¬ distanê tebi'i bîye". Di pişta hejmara 6'an de nivîsandîye:

"Metbe'a(**) Cem'îyeta Tifaq û Qencîya Musilmana teb' bîye" û dawîyê hejmara 20'an de jî nivîsandîye "Li Misrê Metbe'a Cerîdeya Kurdistanê teb' bîye".(***) Di dawîyê hej¬ mara 22'an de bi Tirkî nivîsandîye "Hindiye Matbaasinde tebi'i olunmuştur" û di dawîyê hejmara 28'an û heta 31'an , bi Tirkî nivîsandîye "Intikam Matbaasinda teb' olunmuştur". Beguman ev hemû çapxane û cîguherînên han jî nîşanên din a jîyana muhaciri ya rojnama Kurdî, Kurdistan û bara gelek gi-
*) (**) Ev gotinên han di orîjînalên rojnama bi xwe de hene, le kita¬ be de nînin. Mimkun e şaşîtîya çape be-Malmîsanij.
(***)
v ' Di dawîyê hejmara Kurdistan a 20'an de ev îbara han hatîye nivîsandin: "Misir'da tab' olunmuştur" / "Li Misrê teb' bîye". Yanî qisme "Metbe'a Cerîdeya Kurdistanê" ne orîjînalê rojnama a Tirkî û ne jî Kurdîye de nîne-Malmîsanij.
124
ran a ser milê rewşenbîrên wî qonaxî ya Kurdan e.
Aşkera ye derketina yekem rojnama, di dîroka gelê Kurd de pêvajoyek mezin û destpêkek bi qîmet e. Nincek weşandina Kurdistan a sîyasî û zanistî hebû. Em qet dûr necin, ger ev roj¬ nama han nebûya, mimkun bû heta îro jî me sala wefata şairê mezin ê Kurd, Hacî Çjadirê Köye nezanîya. Di saya Kurdis¬ tan de ev yeka han hat zanîn ku piranîya nivîskarên me di dîyar kirina sala koça dawî ya Hacî Qadirê köye de ber bi şaşîtîyê de bûn. Mamoste Ebdurrehman Seîd, sala 1312'ê koçî nivîsandîye ku ev sal 1894/1895'ê zayînî dike(38). Mamoste Elaeddîn Seccadî, Gîw Mukrîyanî û Mehemedî Mele Kerîm, sala 1892'an nivîsandine(39). Dr.Maruf Xeznedar û Dr.Ishan

Fûad jî wek Edmonds sala 1894'an wefata Hacî nivîsandibûn (40). Mamoste Refîq Hilmî, di kitaba xwe ya "Şiir û Edebiyat" de tenê behsa ji dayîkbûna Hacî kirîye(41). Mamoste Emîn Zekî jî sala 1314'e koçî ku dike 1896/1897'ê zayînî, nivîsandîye(42). Herekol Ezîzan ku naznavê Celadet Bedirxan e, sala 1312'ê koçî nivîsandîye (1894/1895'ê zayînî)(43).

(38)

y ' Komele Ş'rî Hacî Qadirî Koyî, çap û belavker: Ebdurrehman Seîd, Bexdad, 1925, rûpel: 6.

(39)

v ' Binêre: Elaeddîn Seccadî, serokanîyê ku navê wê derbaz bû, rûpel: 309-312, çapa duyem, rûpel: 341-343.

Dîwanî Hacî Qadirî Koyî, Hewler, 1969, rûpel: 5.

Mehmedê Mela Kerîm , Hacî Qadirî Koyî Şairi Qonaxekî Nwê Le Jiyanî Netewey Kurd, Bexdad, Be, rûpel: 9.

*) Binêre: Dr.Maruf Xeznedar, serokanîyê ku navê we derbaz bû, rûpel: 40.

Dr.Ihsan Fûad, Hunermendîy Hacî Qadirî Koyî û Şwênî Le Wêjeyî Kurdî da, kurtey namey doktora wî, bi zimanê Rusî, Moskova, 1966, rûpel; 9.

C.J.Edmonds, Kurds, Turks and Arabs, p.58.

*41) Refîq Hîlmî, Şi'r û Edebîyatî Kurdî, Bexdad, 1941, rûpel: 99-118.

* ' M. Emîn Zekî, Serokanîyê ku navê we derbaz bû, cilda duyem, rûpel: 110.

*43) Binêre: Hawar, Şam, sal: 9, hejmar: 33, 1941, rûpel:113.

125

Pişti van hemû cihêbûnan, kovara Rûnakî sala 1969'an di

gotarekê de bê ku navê nivîskarê wê hatibe nivîsandin, bi alîkarîya rojnama Kurdistan sala koça dawî ya Hacî Qadire Köye bi durustî nivîsandîye(44). Wisa dixuyê ev gotara han a Dr.Kemal Fuad e.

"Kurdistan", di rûpela sayem a hejmara sayem de yekemin sal derbazîya koça dawî yê Hacî Qadirê Köye bi vî awayî nivîsandîye:

"Alimek ji Sora he sala di uiefat kir rehmeta Xwede le be gunehen wî bixefirine nave wî Hacî Ebdulqadir bi. Ev mirov saxîya xwe de gelek xebitî derheqa 'elimandina ilim û me'rifete re gelek beyt û eş'aren Kurmancî dinivîsî ,re dikir melate xwe Sora. 'Ezmane wî 'ezmane Sora ye loma Kurd hemî vî ezmanî nizanin. Pişta kiteba Mem û Zîne de bi xete xetdeste xwe hin beyt nivîsîne teberruken min ew ebyat li ve cerideye de binivîsin, bi diqqet be xwendin mana zvan xûş tet fehm kirin"(45).

Piştî van gotinên, Kurdistan wan beytên ku Hacî Qadir bi desbcetê xwe yê pîroz di pişta rûpela dîwana Mem û Zîna Xanî de nivîsandîye çapkirîye, ji van beyta pêşîn wiha ye:

Zemane resmî caranî nemawe
Çiraxî nazim û mûnşi kujawe

Beyta dawîn de jî wiha dibêje:

Le Kurdan xeyrî Hacî û Şexî Xanî
Esasî nezmî Kurdîy danenawe.

Wisa dixuyê hejmarên Kurdistan pir zû gihîştine destê ge¬lek kesan û bi hemû awayî hestê xelkê bilind kirîye. Di vê hejmara de namek bi navê "N.H." ji Şama, Mîqded Midhed Bedincan re şandine û tê de bi vê dilsozîya han behsa hêjabûna

Kurdistan û xwedîyê wê kirîye:
(44) Rûnakî, îna 23'ê Gulana 1969, rûpel: 41.
*) Deqa nivîsa Kurdistan bê destlêdan hatîye nivîsandin.
126
"...Rehmet li babe te bit Xwede deivleta te mezin biket ew edl û kirina babe te kir niho jî dibit sebebê rehmete ew ceride te ser qencîya Kurda derexistî ev jî nezîk we ye zimane qencî hewqas dibit..."
Piştî vê nama helbesta Kurdek ji Şama yê bi navê Şêx A.Fetah(*) belav kirîye ev yeka han jî aşkera nîşan dide ku rojnama Kurdistan çi dengek di nav Kurdan de daye. Di hej¬marên din de jî gelek ji van nimûnan berçav dikevin.
Qet gumanek di wê de nîne ku rojnama Kurdistan, ronahîyek şewqdar a nû bû, di asoya (ufqa) jîyana rewşenbîrîya Kurd de hilket. Hejmarekê zade ji dîroknivîs û nivîskarên me û yên bîyanîyan, van rastîyên han weşandine. Dr.Şakîr Xesbak û Dr. Blech Şîrkuh, rojnama Kurdistan, destpêka guherîna jîyana Kurd hesibandine(46). Dîyar e her evan sebebên tirsê xist dilê karbidestên Tirkîyê û wisa lê kirin ku her di destpêkî de belavbûna Kurdistan di nav welatê Osmanî de qedexe bikin. Ev rastîya han di naveroka rojnama bi xwe de bi ronî dîyar e. "Derîyê Bilind", bi vê tenê jî nema, di wê nama Mîqded Midhed Bedirxan de ku ji bo Sultan Ebdulhemîdê Duyem şandîye û wek sergotar di hejmara 5'an a Kurdistan de belav bûye, aşkera têt dîtin ku çawa miroven Sultan ketine bahaneya girtin û şerfirotina xwedîyê Kurdistanê, vê yeka han derecek wisa pêşde birine ku êdî daxwaz ji karbidestên Misrê kirine wî welatparêzî Kurd wek "gunehkarek" bişînin

Stenbolê. Wisa dixuyê ku ev eriş û tehdîten han ên çetên Sul¬
tan, Mîqded Midhed Bedirxan naçar kir ku piştî hejmara 5'an,
êdî dev ji weşandina Kurdistan berde. Piştî vê Bedirxanî
naçar bûn cîyê rojnama biguherînin bajarê Cenevrê û li wir jî
(*)
v ' Di orijinale rojnama de di bin vê şiîra navê wê derbaz dibe de
navê Lawê Şêx E.Fetah heye. "Lawê Şêx E.Fetah, naznavek e ku
Emîn Alî Bedirxan bikaranîye. Emîn Alî Bedirxan biraya mezin ê
weşankere rojnama Kurdistan Mîqded Mîdhed Bedirxan e û eynî
wextî baba Celadet û Kamran Bedirxan e-Malmîsanij"
*46) Binêre: Dr.Şakir Xesbak, El-Kurd we Meseletu'l Kurdîyye,
Dr.Blec Şêrko, El-Qezîyyetu'l Kurdîyye Mazîyu'1-Kurd we Haziruhum,
Qahîre, 1930, rûpel: 51.
127
Ebdurrehman Bedirxanê biraya Mîqded Mithed(47) çapkirina
wê girt ser milê xwe.
Bi vî awayî di riya rojnama Kurdistan re mirov dikare ge¬
lek alîyên bi qîmet ên edebiyat û dîroka nû ya gelê kurd ronî
bike. Rojnama Kurdistan, rûpelek gelek hêja û serwetek giranbiha
ya gelê Kurd e.
Pençem
MUHR Û ORGANA "KOMELA KURDISTAN"
Di destpêka sedsala 20'an de û bi taybetî piştî serkevtina
şoreşa sala 1908'an a Tirkên Ciwan ku text û taca Sultan Ebdulhemîdê
zordar ji bin hat kişandin, rewşenbîrên Kurd li
Stenbol û Dîyarbekrê ketin damezrandina komel û rêxistinên
serbixwe; wek Komela Kurdistan (Kûrdîstan Cemîyetî), Kûrt
Te'amîmî Maarif ve Neşriyat Cem'îyetî, Komela Bilindbûna

Kurdistan (Kûrt Tealî Cemîyetî) û h.w.d. Di wan wextan de, her wiha jinên Kurd jî ber bi hişyarîya xwe ve çûn û grubek jinên pêşeng Komela Bilindbûna Jinên Kurd (Kûrt Kadinlari Teali Cemiyeti) damezrandin(48). Roleke gelek mezin a van komelan di tevgera netewî û di jîyana rewşenbîrî ya gelê Kurd de hebû.

Li Kurdistanê lraqê, heta dawîyê Şerê Cîhana yê Yekem tu komel û rêxistin nehatibûn avakirin. Aşkera bû ku wî çaxî gelê Kurd ket nav xebatek asê û dûr-dirêj li dijî Ingilîzê dagirker. Di warê vê xebatê de grubek ji rewşenbîrên vê perçê han a Kur¬ distanê, bi giringî û qîmeta komel û rêxistinan a ji bo ku di jîyana gel de cîyê xwe bigrin, gîhiştin. Bi vî awayî di salan 20'an de, di vê perçê de jî dest hat avêtin ji bo damezrandina çend komele û rêxistinan. Mamoste Refîq Hilmî di vî warî de wiha dibêje:

y ' Mîqded Mithed navekî hevedudanî yê wek lsmaîl Heqqî, Mistefa Kemal û gelek en wek van e, wan deman de li welatê Osmanî de belav bûye.

(48) Kurd Kadinlari Cemiyeti (Komela Jinên Kurd).

128

"Ji alîye zvelatparezen Kurd de. ..her roj komelek dihat da¬ mezrandin".(49) Komelên sîyasî yên Kurdistanê Iraqê di we qonaxê de feydeke mezin ji serpêhatîyên komel û rêxistinên sîyasî yên Kurdistanê Tirkîyê wergirtin. Ji ber ku bi taybetî beşek ji damezrêner û endamên wan ên aktîf berî xelasbûna Şerê Cîhana yê Yekem li Stenbolê xwendibûn û kar kiribûn. Yek ji van komelên ku di destpêka salen 20'an de li Kurdis¬ tanê lraqê hatin damezrandin, Komela Kurdistan (Cem'îyetî

Kurdistan) bû. Ev komela han yekem rêxistina aşkera bû di dîroka Kurdistanê lraqê de ku karbidestên Ingilîzan ji ber ge¬lek sebebên naçar man rîya xebatê bidinê.
Komela Kurdistan, li bajarê Silêmanîyê, roja îna 21'ê Tîrmeha sala 1922'an di civînek mezin a di Mizgefta Seyîd Hesenê Muftî de, di bin serokatîya Mistefa Paşa Yamulkî de hat damezrandin. Di riya dengdana nihênî de, Refîq Hîlmî, Ehmed Begê Towfîq Beg, Salih Çjeftan, Faîq Begê Maruf Beg, Hacî Axayê Fethullah, Izzet Begê Osman Paşa, Ethem Efendî, Ehmed Behçet, Şêx Mihemmedê Gulanî, Şêx Elîyê Serkar, Elîyê Bapîraxa, Ebdullah Efendîyê Mihemmed Efendî û Şukrî Heleke ji bo birêvebirin û organên komela hatin helbijartin(50).
Muhra Komela kurdistanê ya taybetî hebû û li ser wê wiha hatibû kolandin: Cem'îyetî Kurdistan. Li ser navê wê jî wêna rojê hebû(51). Ev muhra han ji alîyê, Xwedê jê razî be, Ebdulezîzê kura Mistefa Paşa ve hatîye parastin.
Her di wê wextê de Komela kurdistan, biryar da organeke hefteyî bi navê Bangî Kurdistan(52) derxe ku yekemin hejma¬ra wê roja çarşemba 8'ê Zulhecceya 1340'ê koçî (2'ê Tebaxa
*49) Binere; Refîq Hîlmî, Yaddaşt (Bîranîn), cilda du, beşê yekem, Bexdad, 1956, rûpel: 28.
*) Binêre: Bangî Kurdistan, Silemanî, hejmar: 1, 2'yê Tebaxa 1922'an, rûpel: 1-2.
*) Binere: wêna ser muhra Komela Kurdistan ku di rûpela 404'ê hejmara Kovarî Korrî Zanyarî Kurd de ye.
*52) Bangî Kurdistan.

sala 1922'yê zayînî) li Silêmanîyê hatîye çapkirin. Li ser hej¬
mara pêşîn a Bangî Kurdistan wiha hatîye nivîsandin: Sahîbî
îmtîyaz û mudîrî mes'ul: (Xwedî û Midurê Berpirsîyar)
Mistefa Paşa
Nivîskarên Kurdî û Farisî: Elî Kemal û M. Nurî
Nivîskarên Tirkî Refîq Hilmî".
Di bin navê rojnama de jî eva han hatîye nivîsandin:
"Zemane gûrz û rim rabûrd (rabvnrd) û esta palewan 'Um e
Silahe dest e sen'et, bariqeî tîx û sinan 'Um e."
" ilmî, içtimaî, edebî, xezeteyekî hurr û serbest e millî ye,
hefte carek derdiçî"(53).
Ji derveyî yen ku bi armancên taybetî hatine derêxistin û rolek
kevneperestî lîstine, hemû rûpelên dîroka rojnamenivîsî
ya Kurdî cîyê şanazîye ne, herçiqas gelek rojname yan kova¬
rên kurdî zor bi dest dikevin jî. Wek belge, li vir bi bê destlêdan
mîsalek biçûk ji Bangî kurdistan em ê bidin. Li ser rûpela
3'an a vê rojnama eva han hatîye nivîsandin:
"Mesrefî çapkirdin ivesaîreyî ewwel nusxeyî em xezeteye le
terefî e'zayanî daîmîy Cem'îyetî Kurdistaneme te'mîn kira û
em ewwel nusxeyey teberrueken we meccanen tewzî' we
teqdîmî biraderanî weten dekre".
Di eynî hejmara de bi navê sahîbî îmtîyaz (xwedî îtîyaz)
Mîrlîva Mistefa, eva han hatîye belav kirin ku ji ber qîmeta
wê bi bê destlêdan em pêşkêşî xwendewanan dikin:
"Es-selamû aleykûm ey Kurdan, ey qewmî qedîmî Pehlervî,
gwe bigrin le Bangî Kurdistan, em bange bo xeberdariy hemû
Kurdan e, bo huşyariyî seran e, bo bîstînî bazvk û daykan e,
gwe bigrin em bange çîy te da ye, em harvare bo çî ye, qisey

pirr û pûçî kolanan, diro helbestinî rejgatvan besîye, temaşay 'alem biken le sin' et û me'rifet da le eme paşkevtûtir ke heye? Kalayekman nîye bo setri ervretman kafî be, derz w dazûyekman man nîye ke destkirdî ivelatman be, nîşaney ezemet û xanedanîş ke este 'ibaret e le şekir û ça eivaneyş hî Kurdistan nin, le cegeyanî dûr ditin. Parçekaxezek ke bo

(53) Ev nivîs wek eslê xwe hatiye nivisîn.

nuştey çervr û serîn be, ewîş le Frengîstanevue det(54), le seda çwarman te da nîye ke kaxezek bo kes û karî w sirrekî mehremane bo aîley xoy binûse. Miski w mîzerman le Eran û Frengistan û gurûnî gul hoqqeyman le Hindûstan û ebay geiorey nazdaranman le Erebîstan û kifinî mirduivanman le Eiorûpa w melûtkey mindalanman le Emerika we bo det".

Hejmarên Bangî Kurdistan bi piranî ji xeber, gotin û gotaran girîng pêk dihatin. Bêguman belgên bi qîmet in ji bo ronîkirina gelek alîyên dîroka nû û hevdemî ya netewa Kurd(55).

Bangî Kurdistan li Silêmanîyê derçûye û 14 hejmar jê hatîye weşandin û di tevan de, li ser rûpela dawîyê rojnama hatîye nivîsandin ku li Çapxana Hukumeta li Silêmanîyê hatîye çapkirin.

Roja weşandina hejmara 14'an a Bangî Kurdistan 8'ê Hezîrana sala 1923'ê ye, pîvana hemû hejmarên 22,1x34 cm. bûye, hejmara 14'an ne tê de (ku ew 4 rûpel bûye), hemû hejmarên din 6 rûpel bûne.

Hêjayî gotina ye, Mistefa Paşaya Yamulkî di destpêka sala 1926'an de, her bi navê Bangî Kurdistan 3 hejmarên din weşandine ku li ser wan nivîsandîye 14-1, 14-2 û 14-3. Di van de Mis¬

tefa Şewqî nivîskar û Kerîmê Rustem jî kargerînê wê bûye.
(54) Frengistan, yanî welatê Ferenkan. ji navê we eşîra Avrupî ya kevin ve hatîye ku bi Latînî Franci û bi Frensî Francs jê re dibêjin. Ev eşîra han ji keven ve xwedî desthilat û dewlet bûye. Di dema Rojhilatîyan de bûye Ferenci û gelek car di cîyê Avrupayê de hatîye bikar anîn û wek gotin di nav çîn û tebeqen jor en civakê de belav bû û heta van dawîyan jî dihat bikaranîn. Wisa dixuyê di riya zimanê Tirkî ve têkelî nav Kurdîya me bûye.
*) Kek Cemal Xeznedar karekî gelek baş kir ku weneyê hejmarên van rojnaman belav kir, bi vî awayî bûye serokanîyekî li ber destan me û yên bîyanîyan (binêre: Bangî Kurdistan berhevkirin û li ser nivîsandin: Cemal Xeznedar, Bexdad, 1974).
131
Şeşem
YEKEM KOVARA ZAROKAN BI KURDÎ
Temenê hemû salan Komara Mahabad ku di roja 22'yê Kanu¬na Duyem a sala 1946'an de damezra û Kanuna Yekem a eynî sale hilweşîya, bûye dema geşkirina rojnamenivîsî ya kurdî. Di wê dema kurt de, li gor Kurdistanê hejmarekê gelek zade rojname û kovar bi zimanê Kurdî hatin dencistin. Wek Kur¬distan, Helale, Hawar, Hawarî Niştiman, Hawarî Kurd û h.w.d. Di wan rojan de di dîroka gelê Kurd de yekemin kovara zarokan bi navê "Girrûgalî Mindalanî Kurd" hatîye weşandin.
"Girrûgalî Mindalanî Kurd", di "Çapxana Kurdistan" a Mahabadê de dihat çapkirin û di bin navê kovara de wiha hatîye nivîsandin: "Bîrî Kargeranî Çapxaneyî Kurdistan e."
Li dor û berê dawîyê bihara sala 1946'an hejmara yekemin

derketîye. Hejmara duyem roja l'ê Cozerdana sala 1325'an (
21 'ê Gulana sala 1946'an), hejmara sayem roja l'ê Pûşperê
1325'an (21 'ê Hezîrana sala 1946'an de) derketine. Wisa
dîyar e ku her ev her sê hejmarên han hatine weşandin(56).
Pîvana hejmara duyem û sayem a "Girrûgalî Mindalanî
Kurd" 22,5x15 cm. e, Çjadirî Mûderrisi berpirsîyarê wê bûye.
Di van herdu hejmarên de çend dersên ziman, coxrafya û behsen
din te de belav kirine. Li ser rûpela yekemin a "Girrûgalî
Mindalanî Kurd" wêna Selaheddînê Eyyubî hatîye weşan¬
din.
*) Hejmara 2 û 3'an a "Girûgalî Mindalanî Kurd" li ba min heye, ç
kesê ku bixwaze dikare jê istifade bike. Her wiha suretên wan di Kitêbxana
Akademîya (Korrî Zanyarî Kurd) de hene.
132
MIJARA HEŞTAN
YEKEMIN ÇAPXANA KURDÎ YA
BAJARE SILEMANIYE
Rojnamegerîyê kurdî eynika raste rast ya rûpelên serpêhatîyên
dîroka gelê me ye* '. Bê xewîtî, hewil û keftûlefta
bêrawestan a eskerên bênav ên wê saha girîng a jîyana
rewşenbîrên me, hêjayî nirxandinek bilind û lêkolîneke fireh
e. Gelek mixabin kesek ji me di wextê xwe de neket pê berhevkirina
serpêhatîyên wan nemirên binax ên ku bingeha dîroka
rojnamegerîyê kurdî danîn. Ji ber vê piraniya wan destanên me
yen nihênî ji kîsê me çûn û evên han li gel ên wek Pîremêrd,
Huseyn Huznî Mukrîyanî, Salih Qeftan û gelek lawên wek
van bi wefa yên xelke me re, çûn bin erdê. Eva han jî wek ge¬

lek tiştên me yên din dibû wiha be!!.
Di sohbetek de, Mamoste Ehmed Xwaca hat ser behsa dewra 60 sal berê niha. Em ketin behsa yekemin çapxana Kurd ku îngilîzên li Silêmanîyê damezrandin. Hinek rastîyên bi qîmet ên ku nayên zanîn ketin destê min ku hêjayî weşanê ne.
Piştî tefandina qonaxa yekemin a Serîhildana Şêx Mehmud
(*) Ev nivîs di "Rewşenbîrî Nwê", hejmara 77, Çirya Yekem 1979, rûpel: 31-34'an de hatîye belav kirin.
133
(dawîyê bihara sala 1919'an), îngilîz ji bo ku zêdetir çaven xelkê bitirsînin û bi zîrekîya xwe dilê xelkê hîn zêdetir ber bi xwe ve bikişînin, Majör Soane kirin hakimê sîyasî yê herêma Silêmanîyê. Majör Soane, ji bo bicîanîna vê wezîfê ji hemû wan îngilîzên wê serdema zêdetir musaîd bû. Kurdîyek baş di¬zanî, baş şarezayê kon û valatîyên vê beşê han ê Kurdistanê bû. Wek hemû dagirkerên din jehr û şekir têkel dikir. Gelek caran pena dibir ber sîtem û zordarîyê, carên wisa jî hebûn des¬tê alîkarîya ji bo grubek dirêj dikir û hinek caran jî kesan di¬kini. Lê wek Avrupîyek pêşkevtî difikirîya û bi xwe jî kurdnasekî mezin bû. Ji ber vê damezrandina çapxanek kurdî pêwîst zanî. Di we serdema de jî îngilîzên ji bo meşandina ka¬ren resmî û ji bo ku propagandan xwe baştir bibin serî, hejma¬rek çapxanên kevin anîbûn lraqê. Li ser daxwaza Majör Soane yek ji wan çapxanan birin bajarê Silêmanîyê û yeka din jî birin bajarê Kerkûke.
Majör Soane bi xwe kara çapxana Silêmanîyê îdare dikir û re û ciyek baş jê re amade kir. Xanîyê Faris Efendî yê li

hemberê mala Heme Axayê Ebdurrehman Axa, jê re girt û kir bingeh. Mezintirîn astenga wî ew bû ku çawan û li ku dê bikare kesên herfan radixe peyda bike. Di wê serdema de karkerên xwendevar kêm bûn. Her çi hal bû, Majör Soane karî sê xorten xwendevar razî bike da ku kara çapxanê bigrin ser milên xwe (Şex Mecîdê Şêx Arif, Edîb Ezîz û Mihemmed Zuhdî). Van her sê pêşengên rojnamegerî û çapxanegeriya kurdî ya lraqe, herfan radixistin, nivîs rast dikirin û vêca bi makînê dest bi çapa dikirin. Her çend ev kara han gelek giran nebû lê rehet jî nebû.

Yekemin kara çapxana Silêmanîyê, amadekirina kaxez û çapa taybetî ji bo bi rêvebirina kar û baran resmî bû. Lê, mezin¬tirîn karan ku kirin weşandina yekemin rojnama kurdî li Kur¬distanê lraqê bû. Piştê keftûleftekê zade, Majör Soane, roja 29'e Nîsanê sala 1920'an yekemin hejmara rojnama Pêşkewtin xist pîyasê. Pêşkewtin (32x20 cm.) hefte carek, di destpêka de çar û pist re jî şeş rûpel û dor û berê du salan bi awakî rêk û pêk derket. Majör Soane bi xwe serkarîya wê dikir û car û caran nivîsên jî te de dida belav kirin, eva han nimûnê yek ji wan

134

nivîsên e:

"Ji bo agahdarîya tevan:

Mecîd kûre Elîyi Hemevoendî, 27 salî ye, mir e, simbelboqi û simbil dirij e, rûyi wî top e û porri wî sor e; mirovek kuştîye û revîyaye, kî xeber bide ka ew Mecîd ku de çûye yan bigre bigihîhe hûkûmeti 300 rûpî de ji re bi dayîn.

Hakime Sîyasî Majör Soane"^'

Pêşkewtin, li gor wext û cîyê xwe rojnameke dewlemend û

pêşketî bû. Grubek rewşenbîrên bi nav û deng ên wek Cemal irfan, Şêx Nurîyê Şêx Salih, Cemîl Saîb û Zekî Saîb berhemên xwe tê de belav dikirin û bi vî awayî cîyek Pêşkewtin a aş¬ kera di dîroka rojnamegerîyê Kûrdi de heye û îro hejmarên wê yek ji wan serokanîyên eslî yên lêkolîna gelek alîyên jîyana gelê me ne.

Li gel vê jî naveroka hejmarên Pêşkewtinê, ji şaşîtîyên mezin û nîşanên paşdemayînê bêpar nînin. Di vir de em vê nimûna han a balkeş dixin ber çav ku wê rojnama derbarê rêça (regeza) Kurdan de belav kirîye. Di hejmareka Pêşkewtinê de, wiha hatîye nivîsîn:

"Dema ku deng û behsi'2* pixemberiya Muhemmed Mustefa (S.E.W.) gihîşt hemû milek, xilxile xist dinyayi û rvisa li hat ku xaqan û sultanan heleqa bendîtîya wî mezinî kirin gûhi xwe. Oxuz (Oðuz) Xan ku di wî wextî de mezintirîn sultani Turkistane bû, bi navi Bexdûz mirovekî maqûl ji Kurdan, bi ser û rûçikin wî ye neşirin ve şand cem pixember(S.E.W.). Dema ku çavin Pexember (S.E.W.) le dikeve, ji ser û rûçikin wî dili wi diheje. Eşîr û qebîla wî dipirse, Bexdûz dibije "ez Kurd im". Ew hezret jî ji re dibije; ew Xwedayî tebareken te'ala vi tayîfa han muwefeqi îttîfaqi neke, ger îttîfaqa wan hebe alem de ji desti wan bizar be. Edî ji wi roji şun de, ji derveyî pinc tayîfe, detvlet û saltanatin mezin ji bo wan rineketîye.."(3).

(1) Pêşkewtin. Silemanî, 3 Adar 1921.

(2) Tene ji alî renivîsê hatîye guhertin.

(3) Pêşkewtin, 14 Çirya Yekem 1920.

135

Majör Soane, ne di riya rojnama Pêşkewtin û ne jî di riya tu karek din nikarî gelê Kurd bide sekinandin. Welatparêzên Kurdistanê serî ber îngilîzên netewandin û nerazîbûnên xwe heta ji destê wan hat zade kirin û wisa kirin ku dagîrker neçar bin rê bidin Şêxê Pîşewa (Şêx Mehmûdî Berzencî -Elîşêr) ji derve, ji dûrketina der û dorên xwe, vegere nav axa welat* .
Di yek belgeyê xwe yê taybetî de, îngilîzên rasterast vê yeka han qebûl kirine ku di wê serdema de "hemû hesti neteiveyî ye xelke Kurdistani ji bo vegerina Şix Mehmud hatibû amade kirîn"* 5). îngilîz neçar bûn serî li ber daxwazên gel bitewînin, plana ji holêrakirina Şêx ji sera xwe derêxin*) û bi wê hêvîya ku "ders" ji wan derd û ezîyetên derbederîya çend salan werbigre, rê bidin ku ew vegere welat*7). Lê, Şex wek welatparêzekî esîl, her kirinên xwe yên berê dikir, ji ber vê ku dema veg¬ erîya ye ji carên berê hîn zêdetir nerazîbûna xwe pêş de biriye ku pê bîyanîyan ji axa welat bibre. Çend belgên din ên îngilîzên behs dikin ku çawa berê Şêx gihîjtiye Silêmanîyê, her di rê de peywendîyên nihênî li gel hazên welat re girê daye û xwes-tîye feyde ji dijîtîyên Kemalîstan Tirkîyê bi
(4) Piştî tefandina qonaxa yekem a serîhildana, Şex Mehmud birîndar bû û esîr hat girtin, piştî biryardana xeniqandina wî ji welat dûr xistin.
(5) Binere; (Iraq. Report on Iraq administration April 1922 - March 1923), London, 1924, P.33.
(6) Di Şerê Derbendi Bazîyan de (17'yê Hezîrana sala 1919'an) Şêx Mehmud birîndar bû, îngilîzên wî li Berdeqareman esîr girtin. Fermanbere
sîyasî ye giştî yê wî çaxî ya Iraqe Arnold Wilson, ji bo ku

"asayiş di Kurdistanê de cebe" ji holêrakirina Şex pêwîst dizanî. Binêre: A.T.Wilson, Mesopotamia 1917-1920. A clash of loyalities. A personal and historical record, London, 1930, P.139.
(The letters of Gertrude Bell), London, eleventh printing, April 1930, P. 433. (Di orîjînalê de reqema nota heftan nehatîye danîn, ji ber vê me jî wek orijinal hîşt -Elîşêr)
136
îngilîzên re werbigre ku wan rojan de ew di Rojhilata Navîn de mezintirîn nehizkerên îngilîzên bûn*°).
Roja 30'yê îlona sala 1922'yan Şex gihîşt Silêmanîyê. Gelek ser de neçû zora da îngilîzên û wan neçar kir ku dev ji navça Si¬lêmanîyê ku cardin banga azadîyê tê de hat bilind kirin, berdin. Dema ku îngilîzên Silêmanîyê terk kirin, nikarîn çapxanê li gel xwe bibin. Ji ber ku bi awakî gelek zû şoreşgeran Kur¬dan dest danîn ser. Vê çapxana han rolek mezin di jîyana sîyasî û rewşenbîrî ya wan rojên nazik ên Kurdan de lîst. Ji te¬van jî girîngtir ew herdu rojname bûn ku wek organên weşanî yên rejima Şexê nemir bi navê Bangî Kurdistan û Rojî Kurdi¬stan hatin belav kirin û her gelek zû bûn rûpelên vekirî yên rojnamegerîyê Kurdî.
Çalakîyên rewşenbîrên Kurd di wan rojan de rik û daxwaza îngilîzên hîn zade kir, îngilîzên xwest ku rojek zûtirîn rejima sava ya Şêx Mehmud bi zindî çal bikin. Top, teyare, pere û hemû kirinên nizm têkel bûn û Şex naçar kir berbeyana 24'ê Adara sala 1923'yan carek din şer bicî de bihêle û li gel alîgirên xwe cîyê xwe biguherîne navça çîyayî ya dor û berê Sûrdaşê. Vê cara şoreşgeran Kurdan ji bo xebata nav gel ji carên din zêdetir cî dan qîmeta çap û çapemenîyê . Ji ber vê yekê di

wan rojên teng de bi hewl û keftûleftê gelek mêrane çapxana xwe li gel xwe birin û Şikefta Casene de bicî kirin û despê ki¬ rin rojnama Bangî Heq pê çapkirin û ji li vir jî digîhandin ge¬ lek herêmên Kurdistanê.

Aşkera ye ku îngilîz bi vê yeka han qayîl nedibûn ku binge¬ ha şoreşa bin destê wan de derkeve û bi wê jî gîyana wan pe veçirin. Ji ber vê dor û berê dawîyê Gulana sala 1923'yan ha¬ zên xwe kirin navça çîyayî ya Sûrdaşê û şoreşgeran Kurdan naçar kirin ku berê xwe bidin Pencwîn û Pîran. Wisa dixuye ve cara nekarîne çapxanê li gel xwe bibin û bi vî awayî ketîye

(8) Binere: (Speciel raport by His Majesty's Government in the United Kingdom of Great Britain and Northern lreland to the Coun¬ cil of the League of Nations on the progress of Iraq for the period 1920-1931), London, 1931, P. 255.

(Report on Iraq Administration April 1922 Marth 1923), P. 36.

137

destê îngilîzên*). Wan çapxanê ji Şikefta Casere birin Silê¬ manîyê û cardin danîn cîyê wê yê berê.

Van gavan jî alîkarîya îngilîzên nekir, her roj di milek de cinên şoreşa Kurd xwe nîsanê wan didan û heta wan naçar ki¬ rin ku cardin dev ji Silêmanîyê berdin. Roja 17yê Hezîrana sala 1923'yan hazên çekdar ên îngilîzên bajêr bi cî hiştin. Hej¬ marek sernizmên welat û rûreşên dîroka jî ku ziravên wan ji tola gel diqetîya li gel wan bajêr terk kirin*10). Şoreşgeran Kurdan, bi navê Şêx, di bin serokatîya Kerimî Fetah Begî Hemewend de kar û baran bajêr girtin dest û heta bi xwe roja 11 'yê Tîrmeha bi serbilindî vegerîya.

Cardin îngilîzên firsetê nedîtin çapxanê bi xwe re bibin, lê

wek carên berê di cî de nehîştin, ji bo ku riya xebatê ber bibirin, mîla wê jê derxistin û li gel xwe birin. Şêx ferman da her çawan be hewce ye çapxane bixin kar. Weste (Hoste) Salihî Silêmanî Cejnî ku çaxmaxsazekî zîrek bû, di navbera du rojan de mîlek din jê re durust kir, bi vî awayî çapxane ket kar. Piştî vê bûyerê bi deste xwe namek ji bo Şêx Mehmud çap dikin û wek mizgînî jê re dibin. Ew jî ji ber xweşîya vî karî, di cîyê 60 rûpî heqê dest de 200 rûpî dide Westa Salihî Cejnî. Piştî vê ji bo cîbicîkirina derêxistina rojnameyek, komîteyek taybetî pek tînin. Endamên komîtê Ehmed Xwaca, Macîd Mistefa, Adilî Şêx Selam, Seyîd Ehmedî Berzencî û Sebrîy Kake Reş, li mala îzzet Beg dicivin û piştî munaqeşê van çend navên han ji bo rojnama pêşnîyar dikin. Kurdistan, Umîdî lstîqlal, Goyje, Weten, Serkewtin, Yekyetî û çend navên din. Van navên han bi cihê cihê ser kaxizan dinivîsin, dipêçin û diçin ber derî, li wir rastî Cjadir Axayê xelkê Pişderê ten, Qadir Axa sê car bi ser hev de navê "Umîdî îstîqlal" dikişine û bi vî awayî ew dibe navê rojname.

(9) C.J.Edmonds, Kurds, Turks and Arabs. Politics travel and research in North Eastem lraq, London, 1957, P. 332.

(10) Di nav wan kesên ku bajêr bi cî hiştin de însanen pak jî hebûn, lê ew bi gotinên îngilîzên xapabûn.

138

îlona sala 1923'an, rojnama Umîdî Istîqlal bûye rûpelek şewqdar a weşana rojnamegerîyê Kurdî. Mihemed Zuhdî* ' tenê bi sere xwe vê rojnama han çap dikir. Tîpên her hejmarek çend rojan radixist û rojekê jî çap dikir.. Piştî derketina hejma¬ ra yekemin, Şex, wî bi 150 rûpîyan xelat kir û maaşa wî jî ji 45

rûpîyan kir 100 rûpî.
Ji hejmara yekemin a "Umîdî îstîqlal" hezar lib hatine çap¬ kirin û di demek kêm de hemû belav bûne, çend libên wê jî di rîya Kifrî re şandine Bexdayê. Kesen wisa hebûn ku ji bihayê wê du-sê qat zêdetir heq didan. Piştî vê hejmara grubek nivîskar kaxiz û murekeb kirrîn. Eynê wextê çapxane ket çapkirina sê cur pereyên taybetî yên ji sê rengan pêkhatî. Yek 'ane, heşt 'ane û yek rûpî. Şêx Letîfê Se'etçî nava wan pûlên kevin qul (kun) dikir û bi vî awayî qerax ji wan re durust di¬ kir.
Dengdana Umîdî Istîqlal gelek tesîr li ser Şex Mehmud kir û wî biryar da ku çapxanek hîn mezintir ji Almanya bide anîn. Lê, plan û zordestîyen îngilîzên dagirker rê nedan bi awakî berfireh grubek rewşenbîrên Kurd bikevin holê. Gelek di ser de neçû, cardin firokan cî li xelkê Silêmanîyê û der û dorên wî teng kirin û dawîyê Gulana sala 1924'an Şêx û alîgirên wî, bi hezaran pîr-kal, jin û zarokan ve neçar bûn carek din bajêr bi cî bihêlin. Piştî dor û berê mehek, dema ku îngilîzên Silêmanîyê îşxal kirin ji 20 000 kesî tenê nêzîkî 700 kes te de mabûn, yên din hemû derkeûbûn (13).
Bi vî awayî weşandina Umîdî îstîqlal jî rawesta. Vê cara firset neket destê şoreşgeran Kurdan ku çapxane bi xwe re bi¬ bin. Mehek di ser de derbaz nebû, dezga nû ya resmî (ya Kur¬ dan) ket belavkirina rojnama Jîyanewe ku hejmara wê ya ye¬ kemin di roja 18'yê Tebaxa sala 1924'an ket pîyase.
(11) Piştê ku Silemanî ji alîyê îngilîzên de hat îşxal kirin, Mi¬ hemed Zuhdî yekser çû Tirkîye. (Di metnê orijinal a kiteba de nota 12'an tûne, ya 13'an heye, le ev herdu notan han jî di qismên notan de

nehatine nivîsandin -Elîşêr).
139
MIJARA NEHAN
CIYE GELE KURD Di ŞOREŞA BÎSTAN DE
Cîyekî gelek aşkera yê Şoreşa Sala 1920'an, di dîroka hevdemî ya lraqê de heye* '. Tenê alîyek wê ya girîng nebe, beh¬ sa serpêhatîyên vê şoreşa dûr û dirêj ji alîyê dîroknivîsên me û yên bîyanîyan de hatîye kirin. Ya ku li ser nehatîye sekinandin, di vê şoreşa de rola gelê Kurd e ku tiştek wisa di derbarê wê de nehatîye nivîsindan û heta îro jî pêwistî bi lêkolîn û nivîsandina ye* \ Heta beşek ji dîroknivîsên derve di wê baw¬ erîya de nin ku goya qet rolek Kurdan di vê şoreşa de nebûye*)
(*) "Birayetî", Bexdad, hejmar: 4, cilda duyem, destpêka îlona sala 1970, rûpel: 22-26'an de hatîye belavkirin.
(1) Ev gotara min çend sal bere di kitêbek min de hat çapkirin ku min wê kitêbê bi zimanê Erebî derbarê cîyê Kurdan di Şoreşa Bîstan de bi ve navê weşandîye: "Dewru'l Şe'bu'l Kurdî Fi Sewretî'l 'Eşrîn el-Iraqîyye, Bexdad, 1978.
(2) Rojhilatnasê Sovyet Prof. N.Awhanisyan, di wê gotara xwe ku di kitaba "Welat û Gelên Rojhilata Nêzîk û Navîn" de bi navê 'Neb¬ ata Hazên Demokrasî yen lraqê di Pênava ji Hole Rakirina întîdabî Britanya de" bilav kirîye, dibêje: goya Kurd beşdare Şoreşa Bîstan nebûn.
140
Ev yeka han jî heye, kesên wek P.W.Areland û S.H. Longrigg, qîmetek wisa bi rola Kurdan nedane. Ji ber vê, ronîkirin û dencistina rola Kurdan di Şoreşa Bîstan de xwedî qîmetek taybetî ya dîrokî ye. Qet nebe ji ber ku ev şoreşa han yekemin

tevgera rizgarîxwazî ya bi mûşterek a herdu gelên mezin ên lraqê, Ereb û Kurd e.
Aşkera ye ku mirov nikare di tenê gotarek de bi dirêjahî û pêwistî rola gelê Kurd di Şoreşa Bîstan de dîyar bike. Ji ber ve em e di vir de hewil bidin tenê çend alîyen wê yên bi qîmet ên wê dewrê bbdn ber çav.
Berê hemû tiştek pêwîst e ev rastîya han bê derxistin ku rola Kurdan Iraqê di çêkirina rîya berpabûna Şoreşa Bîstan de mezin bûye. Demek gelek berê teqîna vê şoreşa, di gelek navçan Kurdistanê de xebateke mezin a çekdarî li dijî îngilîzên dagîrker destpê kiribû. Hemû bi ser hev şeş meh ser hatina îngilîzên de derbaz nebû, gundîyên Goyan bi çek dijî wan serî hildan. Wan navan re li çend navçan Behdînan çend zabitên îngilîzên hatin girtin û hazên dijmin mecbur man ku bi paş de vegerin. Dawîyê bihara sala 1919'an jî çirîskên agirê xebatê hemû navçan navbera Kerkûk û Silêmanîyê girtin û çend car zora îngilîzên birin. Tenê di wî şerê nêzîkî Tasloce yê roja 23'yê Gulana sala 1919'an de, şoreşgeran Kurd, li gor sero¬ kanîyên Britanya bi xwe, karîn hejmarek eskerên Ingilîzan bikujin, çar wasitên zirh û 19 otomobîlên Ford bişkînin* \
Deng û behsen vê serîhildana Kurdistanê tesîrek gelek zade li ser navçan lraqê yên din kir û ket ser deva kesên sîyasî yên Bexdad, Kerbela, Necef û bajarên din. Ev yeka han di milek de bû sebebek din ê aşkerakirina rûyê rasteqînî ye dagirkerên nû û di milek din de p nîşan da ku kolonyalîs kelayek ji polayê ya asê nîne ku kes pê nekaribe, ji ber ku îrada gel dikare bi çek û îttîfaq ve, bingeha ve jî tar û mar bike. Ev jî, bêguman, çava xelke zêdetir vekir, tirsa ku li ser wan bû şikest û bi vî awayî

re ji bo Şoreşa Bîstan xweştir kir. Rojhilatnasê bi nav û deng e
(3) Binere: A.T.Wîlson, Mesopotaîa 1917-1920. A clash of loyalities.
A. personal and historical, London, 1930, P.137.
141
Sovyetî L.N.Katlov, di kitaba xwe ya li ser Şoreşa Bîstan *),
beşek ji bo ve behsê amade kirîye, ji ber ku li gor wî, serîhildanên
Kurdistanê rêçêkerên hêja yên van şoreşan in.
Nimûneyên vê jî hejmarek Kurdan naskirî yên endamên wan
komele û rêxistinan bûn ku destê wan di amadekirin û hilkirina
agirê şoreşa de zade bû, wek "Heres el-Istîqlal" ku kesên
wek Celal Baban endamên wê yên berçav bûn.
Li gor raya van, dema şoreş destpê kir Kurd destgirêdayî ne¬
man. Di wan rojan de çend melbend û navçan Kurdistanê
çalakane hatin pêş û nîştecîyên wan jî li dijî îngilîzên dagirker
serîhil-dan. Her di destpêka de beşek ji serokên şoreşe pêw¬
ist zanîn ku ji derveyê eşîrên Ereban eşîrên Kurdan jî bikişînin
nav kurahîya xebatê*). Ew Kurdan ku li Bexdayê dijîyan
beşdarîya hemû wan xwenîşandan û civînên nîştecîyên vî ba¬
jarî dikirin.
Di destpêka meha Tebaxê şûn de Kurdistan bû ciyê tevlihevîyê
û vê yeka han jî bara ser milê îngilîzên dagirker girantir
kir. Loma naçar bûn beşek ji hazên xwe yên Firatê Na¬
vîn ber bi wir de bînin.
Li Kurdistanê agirê şoreşa berê hemû ciyan li navça Kurdan
Baqube hilket. Roja 14'yê Adara sala 1920'an Kurdan karî
Qizrabat azad bikin.Vê yeka han nîştecîyên Xaneqînê jî
şidand. Pêşmergên vê navçê êrîşeke serkevtî birin ser kompanya
petrola Brîtanya-Iran a navça Neftxanê. Di milek din de jî

karîn xeta trenê ya navbera Xaneqîn-Bexdad,Bexdad-Kingreban-
Kerkûk têk bibin û bi vî awayî peywendîya navbera
hazên îngilîz en Kurdistanê û yên naverast û xwarê Iraqê bi¬
din qutkirin û derbê li wan hazan jî bixin ku îngilîzên ser Irane
(4) L.N.Katlov, Serîhildana Rizgarîxwazî-Netewî ya sala
1920'an li lraqê, bi zimanê Rusî, Moskova 1958, rûpel: 98-99, 104-105.
Ev kitaba han teza doktora L.N. Katlov e. Dr.Ebdulwehîd Kerem
wergerandîye Erebî û li Bexdad û Beyrude çend caran çap kirîye,
lêbelê gelek mixabin, wergerandina wê de gelek şaşîtîye mezin hene,
ku vê yeka han tesîrekî mezin kirîye ser naveroka vê kitaba biqîmet.
(5) Binêre: Adil Xenîme, El Hereketu'l Wetenîyye Fî'l-Iraq,
Oahîre, 1960, rûpel: 9.
142
redianîn ser şoreşgeran.
Van qewimandinên han îngilîz bi temamî şerpeze kirin û
naçar man ku dest bavêjin hêzek xwe ya çekdar a di bin serokatîya
zabitekî xwe yê şareza B. Edward de bînin navça Xaniqînê.
Roja 16'yê Tebaxê, dor û bera 200 pêşmergên Kurd êrîşê
vê haza han kirin û di netîca şerek du seet û nîvan de rîya peş
de çûyînê li wan girtin. Wisa lê hat ku êdî îngilîz neçar bûn ku
hêzek xwe ya din bînin alîkarîya vê hezê* . Ev yeka han, bû
sebebê têkçûna mizana hazan û firset da dijmin ku roja 19'yê
Tebaxê, çend gundên navça Xaniqînê bigrin û rojên pêş jî têkevin
nav bajarê Xaniqînê bi xwe. Dagirkerên li vir bacekî gelek
giran xisti ser milên xelkê bajêr ku bi gunehê piştgirîkirina
şoreşa dihatin "gunehkar" kirin.
Dagîrkirina Xaniqînê nikarî belavbûna agirê şoreşa li nav¬
çan din ên Kurdistanê rawestîne. Daniştiwanên Mendelî Kurd

û Ereb bi hev re mil dan ber şoreşa û kar û baran bajêr di bin serokatîya Musa Efendî de girtin destê xwe.
Di milek din de jî eşîra Delo û beşek ji Cafan, di bin serokatîya Brahîm Xan*) û Weysî Beg de, roja 24'ê Tebaxê, piştî şerek kurt bajarê Kifrî azad kirin û hemû wan hazên dijmin ku li wir bûn esîr girtin, Kapîten Salmon bi xwe re birin û dest danîn ser alaya Britanya ya li wêderê* '.
Deng û behsên serîhildana Kifrî gelek zû di welat de belav bû, bi taybetî piştî vê bûyerê îngilîzên li Bexdadê belavokekê serbixwe di derbarê vê de belav kirin. Tirsê îngilîzên girt ku agirê şoreşa navçan din ên Kurdistanê bigre, ji ber vê zû hêzek xwe ye mezin di bin serokatîya zabitê sîyasî yê Kerkûkê Longrigg de şandin Kifrî. Beşek ji eşîra Zengene û Talebanîyan
(6) Binere: A.L.Haldane, The Insurrection Mesopotamia, Edinburgh, 1922, PP. 158-161.
(*) Kitebek Mistefa Neriman a li ser Brayîm Xanî Delo û serîhildana wî ya bi navê "Şorişî îbrahîm Xanî Delo : 1920" bi Kurdî hat weşandin. Kiteb 214 rûpel e û di sala 1985'an de li Bexdade hatîye çapkirin -Elîşêr.
(7) Ji bo dirêjîya ve behsê binêre: Mukerremu el-Talabanî, îbrahîm Xan Sair Min Kurdistan, Bexdad, 1971.
143
danîn li ba vê hazê.
Di destpêkî de Longrigg hewil da ku bi riya muzakerê re serokatîya serîhildana Kifrî razî bike da ku xwe bidin dest. Lê vê yeke feyde nekir, ji ber ku şoreşgeran navçê li ser serîhilda¬na bi qerar bûn. Di wî navî re ku êrîşa îngilîzên destpê kir, şoreşger naçar man ku xwe bikişînin navçan asê yên dor û bera

bajêr. Dema ku li wir sehkirin ku kurekî serokê Kurdan hafiye kuştin, di cîyê wî de Kapîten Salmon kuştin ku heta wî çaxî bi rêz li ba xwe hiştibûn. Kuştina Salmon, Longrigg bi tevayî şidand û ewî jî di bersîv de cezaya dana 10 000 rûpî û 500 tiving xist ser danişiwanên Kifrî* '.

Serîhildana nav cergê Kifrî, eşîrên wan navçan şidandin, Beyatîyan Tuzxurmatu azad kir. Di nav bajarê Kerkûkê de grubek sîyasîyên nihênî dest bi çalakîyên kirin. Hejmarek ji welatparêzan hewil dan ku bi alîkarîya Şêx Qadirê Sîyamensorî rê li hazên Longringg bigrin û nehêlin biçe Kifrî. Lê, Longringg bi vê yeka han hesîya, cîyê ku êrîşê bibe ser Kifrî bir ser gundê Şêx Qadir, piştî şerek çend se'etan, bi alîkarîya firokan vî gundê han kavil kir û bi vî awayî rola şoreşgeran wê.navçê de pûç kir.

Herçî ku navça Silêmanîyê bû ji ber çend sebebên têkel, nikarî di rojên Şoreşa Bîstan de rolek wisa girîng bilîze. Ji ber ku bi taybetî hemû li ser hev di navbera çend mehan de îngilîzên karîn cî li welatparêzan teng bikin û serokên tevgera rizgaribcwaz jê dûr bixin. Di saya vê de Majör Soane yê serokê ba¬ jêr jî karî grubek serokeşîrên navçê bikrre û heta hinek axayên Pişder hazên xwe yên taybetî jê re şandin. Wî xwest di riya wan re çava xelke nevçê bitirsîne* \ Lê di ser van tevan de jî, wan rojan çend serîhildanên biçûk ên navçeyî teqîyan, wek li Sengaw, di nav mirovên Mehmud Xanê Dizilî de.

Rewşa Hewlêr û ya der û dorên we gelek ji vê jî aloztir bû. Hîn li navçan Firatê Navîn şer destpê nekiribû, navek re da¬ nişiwanên Hewlêrê çend caran civîyan û piştgirîya daxwazên

(8) Ebdulrezaq El-Hesenî, El-Sewretu'l Iraqîyye'l-Kubra, Seyda-

Beyrut, 1952, rûpel: 170A-170B.
(9) Binere: L.N.Katlov, serokanîyê ku navê we derbaz bû, rûpel: 144
şoreşa kirin. Xelkê derveyê bajêr jî rewşa sîyasî ya aloz a wan rojan firset dîtin û ewan jî dest çalakîyên kirin. Roja 21'ê Tebaxa sala 1920'an, nêzîkî Rewandizê grubek çekdarên Kurd erîş birin ser Kapîten Hay û çend car jî êrîşê alîkarekî wî kirin ku bi tesadûfi ji mirinê xelas bû.
Rewşa sîyasî ya Hewlêrê ewqas aloz bû ku cîgirê hakimê sîyasî yê gîştî yê we demê yê lraqê A.T.Wilson neçar kir ku roja 8'ê Ilonê ew bi xwe bi firokek taybetî biçe wir. Wilson, li Hewlêr di gel zabit û karbidestên îngilîz, grubek serokeşîren Kurd û hinek mirovên giregir ên bajêr civîya, ji wan re behsa "serkevtina mezin" a îngilîzên li navça Firatê Navîn kir û şiv li guhê wan xist ku goya "rewşa Silêmanîyê sakîn" e* '.
Lê ne hatina A.Wilson ne jî tehdit û lîstikên wan, nikarî çavên xelkê Hewlêr û yên dor û berê wî bitirsîne. Piştî vegera wî li Bexdad, navbera demek gelek kurt de îngilîz bi wê yekê hesîyan ku welatparêzan Hewlêrê ji bo derêxistina wan ji Hewlêrê û danîna hukumetek serbixwe xwe amade kirine. Ji ber vê naçar bûn bi du milan de, yek ji Kerkûk a din p ji Musil ve du hazên xwe yên nû bînin ser Hewlêrê. Hejmarek axayên Dizeyan jî hatin hawara wan û bi vî awayî karîn Hewlêr îşxal bikin*). Lê vê yeka han tesîrek wisa mezin li ser rewşa alozî ya navçan Hewlêrê nekir. Surçîyan, van rojan ji xwe re firset zanîn û roja l'ê îlonê Batasyan azad kirin, piştî vê bere xwe dan Rewandizê û hêzekê lîwa ya îngilîzên kirin bin abluqeyê. Surçîyan di şerek giran de li Rewandizê 18 eskerên

lîwayê kuştin* '.
Piştî vê bûyerê vê haza han nikarî xwe li Rewandiz ragire û bi neçarî vegerîya Hewlêr. Di dawîyê de Rewandiz û Köye jî ketin nav tekelîyê û roja 8'e îlonê zabitê sîyasî yê bajêr çû wir. Rewşa herêmên Behdînan gelek ji van baştir nebûn. Bûyeren Kurdistanê bi xwe û kuştina Kapîten Lichmen ji alîyê şoreş¬ geran eşîra Zewbe'î ya navça Rumadîyê, bi tevayî hestên
(10) A.T.Wilson, Op. Cit., P.288.
(11) A.L.Haldane, Op. Cit., PP.246-247.
(12) Ibid, P.246.
145
(hîssên) xelkê Behdînan dijî dagirkerên şidand. Li gor belgek nihênî ya Frensizan, di zorkerîyê de mîsalên Lîchmen tunebûne*). Tev li ser hev salek berê we dema ku zabitê sîyasî yê Musilê bû, xwest nêzîkî hezar malbatên Behdînî derbeder bike, xelkê din bîne di cîyê wan de bi cî bike û axa bab û bapîrên wan ji wan zeft bike. Ji ber vê, daxek wî li ser dilê xelkê navçê hebû. Hewla kuştina yekî wek wî xelkê şidand.
Eqreyê wê demê serî hilda. Kurdan Ezîdî jî her di destpêka de piştgirîya şoreşa kirin, wek mîsal alîkarîya wê hazê kirin ku êrîşê birin ser Tele'fer. Lê dudilîya Komela Ehdî lraqî ku kar û baran şoreşa li navça Musilê îdare dikir û terkexemîya sero¬ kê wê yê naskirî Cefer Eskerî, bû sebebê sarbûna şoreşgeran vê navçê, ji ber vê nikarîn rolek wisa zade bilîzin.
Heta dor û berê dawîyê havîna sala 1920'an, hazên îngilî¬ zên karîn agirê şoreşa di piranîya navçan Başûrê lraqê de bi¬ tefînin. Dîyar e vê yekê tesîrê li ser Kurdistanê jî kir û tirs xist nav serokeşîran. Xoşnawî û Gerdî li gel îngilîzên ketin mû¬

zakere û qerar dan ku li dijî wan nesekinin û çi zerarên wan di wan navçan de çêbûye îngilîz bidin wan. Surçîyan û grubek din serokeşîran Kerkûkê û Silêmanîyê jî ketin peydakirina nezîkîyê bi îngilîzên re*14).

Bele, herçiqas gelê Kurd dikaribû feydek ji wê rewşa aloz werbigre ku Şoreşa Bîstan anî holê û bi xwîna lawen xwe rûpelekê gelek hêja ji bo xwe weşîne, lê bêguman, dikarî rolek hîn ji vê jî zêdetir bilîze. Dîyar e ev yeka han mimkun nebû, ji ber ku netîca gelek sebebên bi hev ve girêdayî bû. Piştî destpê kirîna Şoreşa Bîstan, di navek re dikir ku îngilîz dest ji hazên welatparêzan Kurdistanê bikişînin. Kêmterkexemîya (îhmalkarî) serokatîya şoreşa rolekê gelek xirab lîst, "Mektebu'l Sewre" ku îdarekirina şoreşa ketibû ser milê wê, nikarî heta tik û tene liqek jî di Kurdistanê de damezrîne. Serokên şoreşa

(13) Binere: Direction Politique et Commercial, (Weşanên Wezareta derve ya Frensa), Mesopotamia, E-314, Armee, No: 348, 24.VIII, 1920.

(14) L.N. Katlov, Serokanîyê ku navê we derbaz bû, rûpel: 167.

mesela Kurd fam nedikirin, ji ber vê ne di tu gotarek de, ne di belavokek de, ne li ser rûpelên yek-du ji wan rojnamên ku ji alîyê şoreşgeran de dihatin weşandin, ên wek "El-Firat" û "El-lstîqlal" û ne jî dûr an nêzîk xwe nêzîkî sînorê vê mesele nekirin, herçiqas li gor çarçova ku danîbûn Kurdistanê Başûr jî di nav vê hukumeta de bû, lê qet rîyek ji bo sîyaseta netewî ya vê hukumeta serbixwe ku dixwestin damezrînin, dîyar nekiribûn. Dema ku em li hinek bûyeran dinerin, em kêmterkexemî û kêmasîyan serokatîya şoreşa baştir fam dikin. Grubek we¬

latparêzan wek Refîq Hilmî û Fayiqî Tapo, di germîya şoreşa de hewil didin ku di riya şoreşgerekî Kurd ê Bexdayê, Miste¬fa Beg re, peywendî bi serokatîya şoreşa re deynin*15).
Di milek din de îngilîzên di her çar aliyan de ji bo agirê nakokîya netewî û ayînî çirîsk geş kirin. Di vê riya nelibar de karîn beşek ji xelkê sade yê Kurdistanê ber bi şaşîyê de bibin û wan bikin dijî şoreşgeran Kurd ên ku goya li gor gotina wan "ketibûn bin tesîrê Erebên Şîî".
Ev hewl û planên îngilîzên bêber neman. Konsolosa Britan¬ya yê Kirmanşahê, karî beşek ji eşîra Sencawî bixapîne û bi çek bişîne ser şoreşgeran Xaniqînê û Kifrî*).
Beşek jî ji eşîra Kelhurê hatin alîkarîya îngilîzên û ji wan re bûn notirvanê parastina kanîya neftê nêzîkî Xaniqînê* '.
Di milek din de jî Ingilîzan karîn çend grubek ber bi şaşîyê de bibin û bikin dijî şoreşgeran Kurdistanê. Nîvê îlona sala 1920'an, li Sero û Musilê serekî giran di navbera wan û şoreş¬geran Kurdan de qewimî. Li gor serokanîyên îngilîzên, di wî serî de nêzîkî 60 kes ji Kurdan hatin kuştin û 140 kes jî di ava Zê ya Mezin de xeniqîn*18).
(15) Binêre; Refîq Hilmî, Yaddaşt, cilda yekem, beşe yekem, 1956, rûpel: 76-77.
(16) Binere: P.W. lreland, Iraq. A study in political development, London, 1937, P.270, A.L. Haldane, Op.cit., PP.158-160.
(17) L.N.Katlov, kitaba ku navê we derbaz bû, rûpel: 156.
(18) A.L.Haldane, Op. Cit., P.247.
147
Bele, her çend Şoreşa Bîstan ser neket, lê gelek dersên mezin da gelê Iraqê yê Ereb û Kurd. Yek ji wan dersan; denristina hêjabûna

xebata bi hev re bû, ev xebata han diviya ku bibe kevirê hîma hemû tevgera rizgarîxwazî yê gelê Iraqê.

148

MIJARA DEHAN

SEBEB, NETÎCE Û QÎMETA

ŞOREŞA BÎSTAN

1- SEBEBE ŞOREŞA BÎSTAN

Kesek bêteref nîne guman ji mezinbûna Şoreşa Bîstan bike(*). Dîyar e her bûyerek yan tevgerek serbixwe ya ku pişta xwe bide bi dehan hezar gundî, pale, karker, rewşenbîr û "feqîr û jaran", di riya mafê bi heq yên gel de bikevin nav saha xebatê û çek di destan wan de, êrîşê bibin ser mezintirîn hazê emper¬ yalist ê cîhana, divê bûyerek azadîxwaz û tevgerek peşkevtîxwaz be. Ev yeka han heta mizana meselê guherand û nerîca vê bûyerê mezin a sala 1920'an gelek navçe û melben¬ dên lraqê girt û seranserî wî şidand, li hemû Rojhilata Navîn, Nêzîk û Awrupayê jî deng da.

Piranîya belgên dîroka vê yeka han qebûl kirine ku bûyerek wiha mezin bi sera xwe durust nabe, divê gelek sebebên serekî û biçûk têkelê nav hev bin da ku bûyerek wiha bînin holê û wisa tesîrê bi hezaran kes bike ku amade bin gîyana xwe bi

*) Di kovara "Karwan" hejmara 10'an, sala 1983, rûpel; 21-31'an de hatîye weşandin.

149

dil bibexşînin, wek li ba herkesi aşkera ye, bi dil û can bexşîna gîyanê di riya welat de mezintirîn dereca xebatê ye. Belê, vêca ger wiha be, berê hemû behsên din carek ka em çav li wan sebebên bingehîn ên ku agirê Şoreşa Bîstan berpa kirin bigerînin.

Berê destpêka sedsala 20'an, hestê (hîssên) netewî û daxwaza serxwebûnî di nav seranserê gelên bindestên Osmanîyan de bi tevayî sera xwe hilda, ger hestê ayînî û rêza "xelîfetîya Musilmanan" nebûna, her wî çaxî cihêbûna bi heq dibû slogana serekî ya xebata rojane ya Kurd û Ereban û qet dûr nebû ku vî karî han ew Imparatorîya Osmanî ya ku ji çeng û perrên xwe ketibû têk bibira.

Li gel temambûna Şerê Cîhana yê Yekem û ketina rejima Os¬manî, hêvîya gelên Rojhilata Navîn ji bo cîbicîkirina mafê çarenivîsa tam pêş ket, bi taybetî piştî wê ku di salan şer de karbidestên welatên mezin her caran soz didan, vî mafê han çarmedorên xwe de belav dikirin û digotin ger şer temam be dê hemû gelên navçê serxwebûnîya xwe werbigrin(l).

lraqî yek ji wan gelan bûn ku çendîn sal bû xeyala serxwebûnîyê kiribûn mêjîyê xwe. Li ba wan wisa bû ku li gel te¬mambûna Şerê Cîhana yê Yekem, îngilîz kel-pelên xwe didin gul û wan gulên nazik ên azadî û serfirazîyê dikin ber pêsîra wan. Kesek tegihiştî tunebû ku ew gotina General Modî dibîra wî de nebe ku roja 11 'yê meha Adara sala 1917an li gel dagirkirina bajarê Bexdayê got. Wî got "em azadker in ne dagirker".

Lê, çi heye ku eynî wextî îngilîz ketin reh û rîş avêtin û damezrandina dam û dezgên xwe. Dema ku şer jî xelas bû êdî kesî carek din xwe li nêzîkî behsa serxwebûnîyê nekir. Ji vê jî xirabtir ev bû ku grubek karbidestên mezin ên îngilistanê aşkera dbcwestin lraq bi Hindîstanê ve girêbidin da ku bibe beşekê wî. Yen wisa jî hebûn ku dixwestin taca paşatîya Bex-

' ' Piranîya naveroka ve gotara xwe min ji wê kiteba xwe girtîye ku di sala 1978'an bi Erebî di derbare cîyê Kurdan di Şoreşa Bîstan de

hatîye belav kirin. Ji ber ve ez pêwistî nabînim hemû perawêzan ducarî bikim (Binêre: "Dewru'l-Şe'ebu'l-Kurdî Fî Sewretu'l 'Eşrîn el-Iraqîyye", Bexdad, 1978).

150

daya deynin sera mirovek îngilîz ê wek Sir Persi Syks.

Piştguhkirina axaftinên xwe yên berê yên îngilîzên ên der¬barê sencwebûnîya lraqê, bû sebebê teqîna hestê nerizayîyê di hindurî piranîya sinif û tebeqên civakê de. Gelek belgen tay¬betî yên şoreşa hene ku vê rastîyê îspat dikin. Navê yek ji wan herdu rojnamên şoreşgeran ku Necefê azad kirin diweşandin navê wê "El-îstîqlal" yanî serxwebûn bû. Vê rojnama han di bin navê hemû hejmarên xwe de vê slogana han dinivîsand: "Jîyan Bi Serxwebûnî Ne Mumkun e!".

Di hejmara 5'an de "Istîqlal" wiha nivîsandîye:

"Serxwebûnî û Azadî.. .sertin serkevtin û bingeha pişkevtina ivelat in"(2) .

"El-Firat" ku yekemin rojnama şoreşa bû, çend caran rasterast ve yeka pan qebul kirîye ku mebesta serekî ya şoreşgeran cîbicîkirina mafê çarenivîs û bidesbcistina sencwebûnê ye. Di sergotara hejmara 2'yan a Firatê de wiha hatîye nivîsandin:

"Iraaî baş bi we ti gihîştin ku daxwazen qanûnî û xwenîşandanin aşîtî ne feyde didin, ne jî bi zvan maf tin silendin. Bi taybetî ji ber ku îngilîzên dest danîne ser hemû ivasiteyen peyvoendîyen welat dengi nerizayîyin bi heq ya wan nagihîje qet tu dezgeheke sîyasî ya derve, "(3).

Ji ber vê yekê diviya ku di riya lula tivingê re daxwaza bi heq ya sencwebûnîya gel û welat cîbicî buna.

Rast e hemû wek hev behsa sencwebûnîya nedigihîştin, ji ber

ku bi hezaran kes hebûn ku ev bîr û bawerîyên han bi awakî rasterast nedigîhşt wan. Bi taybetî gundî ku bi sebebê pelçiqandina derebegî û şêlandina bi sedan sal ên Osmanîyan ve, wek kevirê bin axê li wan hatibû. Lê, ew grubên ku ji tevan baştir bi qîmeta sencwebûnîya digihîştin, mebesta wan ew bû ku li gor imkanên xwe van daxwazan ji bo sinif û tebeqên cur bi cur ên civakê ronî bikin. Di yek nivîsek liqa serokatîya şoreşa de ku heta îro jî maye, rêberên tevgera rizgarîxwaz a we rojê

*2) El-Istîqlal, Necef, hejmar: 5, 25 Muherrem 1339 (Çirya Yekem 1920).

*3) El-Firat, Necef, hejmar: 2, 28 Zîlqe'de 1338, (14 Tebax 1920).

151

ya lraqê, daxwaz ji serokeşîran ser bi cebha netewî kirine ku slogana sencwebûnîya ji bo der û dorên xwe bidin famkirin. Divê di hemû xebatên xwe de hawar bikin û bêjin; "me serxwebûnî divil".

Qanuna jîyana tesîrek wisa kirîye ku gelek car nebûna serxwebûnî û tehdaya aborî bi hev re birijin nav yek rêçe. Vê rastîya han xwe aşkera di Şoreşa Bîstan de îspat kirîye. Di riya nan de feqîrên lraqê bi vê tê gihîştin, cihêtîyek mezin di navbera dagirkerên îro û yên do de nîne. Belko çend sebebên bi tesîr jî di saha de bûn da ku wisa li wan bike rojê hezar rehmet li kefenê dizan bînin.

Çi heyf ku gelek ji dîroknivîsên me wek sebebek aktîf a bûyerên dîroka qîmetek mezin nedane milên aborî, ji ber ku ji alîyê wan kesan ve însan kevirên dama yên bê hest û gîyan e. Rast e, hişê gundîyên kêmfam ji yê gundîyên nefam baştir ber sebebên birçîtî û riya çareserkirina wê diçe. Lê ev jî rast e ku

birçîtî nava herdukan wek hev dihejîne û birçî ji têrê zêdetir amadeyê xebat û fedakarîyê ye. Birçîtî perçek ji bûyerê jîyana ye ku tu car ji bîr naçe. Di civakên paşdemayî de dibin nişan û dîrok. Me seh kirîye dibêjin "filan kes sala giranîyi ji dayîk bû", yan "jin anî", yan "koça daivîyi kir". Demek berê niha dema ku rojnamegerek daxwaz ji jineka pir a ji bajarê Kufê dike ku behsa serpêhatîyên xwe yên bere jê re bike, berê hemû tiştê wê behsa serpêhatîyek xwe jê re gotîye ku çawan carek ser dema fermanrewatîya Mîthet Paşa de bacgirên mîrî ha¬ tine gundê wan, piştî wê ser daxwaza biraya xwe dewarên xwe veşartine û mirovên xwe li dijî wan dane rawestandin û piştî lê-xistinek xweş wan ji gund derxistine(4),

Ji ber gelek sebebên bi hatina îngilîzên re bara jîyana pira¬ nîya sinif û tebeqên gel, ber bi xirabîyê de çû, li ba tevan wisa bû ku ber bi nemana desthilata Osmanîyan birçîtî ji holê radibe. Beşek ji wan sebebên derveyê taqeta desthilat û daxwaza îngilîzên bûn. Serpêhatî û netîcên Şerê Cîhana yê Yekem

*4) Binere: Kovara "Elifba", Bexda, hejmar: 479, 23 Çirya Duyem 1977, rûpel: 24-25.

152

bara aborî yê ser milê tevan ji bere girantin kir. Wê demê în¬ gilîz bi xwe rasta gelek problemên aborî yên giran hatibûn. Bi sebebê şer ve nêzîkî ji sisiyan yekê serweta xwe ya netewî winda kiribûn. Ji ber vê di welatên bindestên xwe de ji carên din bê merhemettir bûn. Dixwestin beşê piranîya zerarên xwe ji xelkên van cîyan derêxin, yan qet nebe beşek ji erkê hazên xwe yên dagirker bixin ser milê wan, ji ber ku bacdarên în¬ gilîzên bi xwe li Wersaille ketibûn nav tirsek mezin, ji ber ve

kesek ji karbidestên wan cur'et nedikir bibin sebebê tehrîkkerîya vergîyên nû.
Bi vî awayî li gel temambûna Şerê Cîhana yê Yekem tehdayî û zordarîya aborî ya dagirkerên domand. Çi belgên îngilîzên û çi jî belgên şoreşa tijî nimûnên ispata van rastîyan in. Li gor belgên îngilîzên, ew bacan ku Iraqîyan di salan 1919-1920'an dan îngilîzên, du qasî wê baca bûn ku sala 1911-1912'an de didan Osmanîyan. Berê destpêkirina agirê Şoreşa Bîstan, ew bacan ku lraqîyan dida dagirkerê welatê xwe, deh qatê wan bacan bûn ku Hindûyên Pencapî didan wan. Rojnama Dail Mil a Londrayê di hejmara xwe ya 12'yê Tîrmeha sala 1920'an de, yanî di germîya şoreşa de, di warê mesela bacan de wiha nivîsandîye:
"Li gor butça sala 1919-1920'an, ew bacen ku ji îraqi hatîye sitendin 5 500 000 pavie ye, yanî para herkesi du pawe ketîye, nimunin vi yeka han heta niha tu rvelaten rojhilati de nîne.
Li Britanya Mezin ku gelek deivlemend bû, di wexti Sere Cîhani yi Yekem de seri kesek 3,5 paive bac diket".
Di vî warî de ger em hinek xwe nêzîkî navçan Kurdistanê ya lraqê bikin, em rasta gelek nimunên ecêb tên. Li wir melbendên wisa hebûn ew baca didan, ji %16 ji wê zêdetir bûn ku li gor qanunê diviya ji melbendên qismên navîn berhev bikin.
Qet tiştek ku bikaribe wek wê wezîfa zorî ya ku bi sebebê îngilîzên ve ket ser milê titûnvanên Kurdistanê, di vî warî de behsa me ronî bike, tûne. îngilîzên, qîmetek gelek zade dan tituna Kurdistanê. Ji bo vê mebesta grubek şareza ji derve anîn.
Yek ji wan pisporê Amerîkî yê bi navê Chetraws bû. Netica vê qîmetpêdanê, berê her tiştî xwe di wan bacan zordarî de xist

pêş ku ket ser milê titûnvanên Kurdistanê. Li gor ve, diviya
153
heryekî ji wan panzdeh qat hindî wê baca bidin ku bab û bapîrên wan di dewra Osmanîyan de didan.
Eynî bi vî awayî îngilîzên qîmetek dan hemû berhemen zi¬raetê, daristan, pez-dewar û hebûnên din ên welat. Heta yek ji mirove Dezga Parastinî ya Belgên Kevin, tenê ji bo behsa berhemen din ên navça Hewlêrê amade kirin(5). Bêguman kes di wê bawerîya de nîne ku ev cure qîmetpêdan nişana pêşketinê ye, mebesta serekî ya wî çaxî ya îngilîzên bac û bacgirî bû.
Hejmarek ji karbidestên navçan Kurdistanê ji xwe re lîstên baca yên taybetî danîbûn. Lîsta Majör Soane yê bi nav û deng ku ji bo Silêmanîyê û dor û berê we danîbû, wek di îlaweya roj¬nama Pêşkewtin de hatîye belav kirin, ji 23 xalan pêkhatibû (6). Li gor vê lîste, cotkarekî ku zevîyên mîrî bikar dianî, di¬viya %40 berhemên xwe bibe qişlê. Xwedî rez û bostanan pêwîst bû ku sala rûpîyek(7) ji bo daran xwe yên pênc salî û rûpî û nîv jî ji bo daran ku heft salî yan ji heft salî zêdetir bûn, bi¬din. Ev pere bi hindikî pênc qatê wan peran bûn ku xwedîyê dancurmeyek li başûr dida û bi kêmasî danzdeh qatê wan pe¬ran bû ku xwedîyê dancurmeyek a di dewra fermanrewatîya Osmanîyan didan.
Bi vî awayî lîsta M.Soane riya xelasîyê ji bo kesek nehiştibû.
Her bi vî awayî jî M.Soane karî erkê idari û eskerî yê seranserê navça Silêmanîyê bixe ser milê nîştecîyên wêderê.
Sala ku Şoreşa Bîstan qewimî, M.Soane, nêzîkî 3 200 000 rûpî ji bacan berhev kir, bi van peran jî navçê idare kir û xelkê bêdeng

kir. Ji vî perê nêzîkî 2 milyonan ji bo karan eskerî û çêkirina rê, xanî û piran xerc kir û yê mayî jî kir xercê xwe û mirovên xwe(8).

*) Binere: El-Merkezu'l Wetenî Lî'l-Wesaîq, Bexda, reqemu'l-mlf: 1000. Sub Agriculture -Arbil Division, 1920.

*6) Pêşkewtin, Silêmanî, 17 Hezîran 1920.

*) Li gel dagirkirina lraqê, îngilîzên rûpîya Hindîstanê di cîyê lîre û quruşê Osmanîyan xistin bazara.

*8) Pêşkewtin, 23 Kanuna Yekem 1920.

154

îngilîzên gelek caran bi destura Osmanîyan bi hezaran gundî di karan rojane de didan xebitandin û bi wan; rê, xanî, pir û bendên avê didan çêkirin. Bi xwe jî vê yeka han qebul dikirin ku çawan car û caran bi zora çek kar bi wan gundîyên dane ki¬rin. Dûncistina gundîyên ji karan wan bi vî awayî, hem bû sebebê perîşanî û têkçûna gundî û hem jî yên axan. Li ser van tevan de jî gelek caran berê keda wan a ji karan giran ber valatîyê de diçû û dibû sebebê malwêranîya wan bi xwe. Yek ji wan raporên ku ji Parlamentoya Britanya re hatibû şandin, behs dike ku çawan îngilîzên ji bo bilindkirina ava nav rûbarê Dîclê çend co û bendên avê durust kirine da ku bikarin gemîyên xwe li ser bikarbînin. Ev kar jî bû sebebê çikîna ava li ser saheyên gelek fireh ên zevîyên çeltîkan ên eşîrên nişteçî 'Emare û Suqu'l Şuyûx.

Bara giran ê bacan nû yên îngilîzên li ser gund û gundîyên tenê nema, bi zû van bacan xwe ser nefesa xelkên bajêran jî siwar kirin. Kar gihîşt wê nuqtê ku hakimê sîyasî yê Necefê baca "mirinê" jî dani. Diviya mirovên (pismamên, eqrebeyên)

mirî, ji bo definkirina mirîyên xwe jî "baca xwe "(!) bidana.
Sala 1918'yan hatinên vê baca ecêb gihîşt 48 000 rûpîyan û biryar wisa bû ku di navbera salek de bigihîje 1 200 000 rûpîyan. Dema fermanrewatîya Osmanîyan de bacdaran bi hezar re û falan dikarin xwe ji beşek mezin ên bacan xelas bikin. Navçe û melbendên wisa hebûn ku destê dewleta nedigihîştê. Sidîq El-Demlûcî dema ku behsa dîroka Behdînan dike wiha dibêje: Berê Şerê Cîhane yê Yekem, hejmara jendirmên gelek navçan ji sê çarîkan derbaz nedibûn, ew jî tev wek kûçikan li wan dihat. Carên wisa hebûn ku ji du-sê mehan carek ûcret (maaş) wernedigirtin. Ger destê alîkarîya xelke nebûna ji birçîna dimirin(9). Veca çi kesê ku bixwaze bi hêsanî dikare dereca desthilat û bêserûberîya bê sînor a wê dewra bigihe. Ew yek di bin sîya desthilata bi hêz a îngilîzên de zehmet bû mirov bikare xwe bilivîne. Çunkî dagirkerên nû xwedîyê zabit, karbi-

*) Sidîq el-Demlûcî, Emaretu Behdînan el-Kurdîyye ew Emareu'l-'lmadîyye, Mûsil, 1952, rûpel: 81, 149-150.

destê dilsoz, şareza û lêhatî bûn. Mîtralyoz, top û firoke bikar dianîn. Kovara Londra ya bi nav û deng "Rojhilata Navîn û Nêzîk" vekirî dibêje heta ku firokan jî li dijî bacdaran bikar dianîn(lO). Li gelek navçan ji bo berhevkirina bac û seranan bi awayê ku quruşek li ser kesî nemîne, îngilîzên daxwaza alîkarîya hesabzanên Cihûyan dikirin. Kesên kal û pir ên ji bajarê Semmawe, heta niha jî navê Sason Efendî bibîr finin ku dibêjin; bênderan bi denk debijard. Ji bo îbret, cara wisa hebûn ku evserên sîyasî, kesên ku xwe ji dana bacan vedişartin, rezîl dikirin; bi cil û bergên sor ve ser-çavên wan tenî dikirin û di

nav bajêr de digerandin.
Bêguman, ev hemû eziyet û tehdaya dagirkerê nû, li ser xelkê Iraqê nedibû ku belavî seranserî axa welat nebe. Hejmarek belgên şoreşe li ser van behsan disekinin. Rojnama el-Firat di hejmarek xwe de berê xwe daye Arnold Wilson ê cîgire hakimê sîyasî yê giştî û jê re wiha gotiye:
"Li seranseri hemû navçan, heta wi pariya nav niklin teyran jî je zept kirîye û mijîye nav hestîyin wan jî ji derxistîye û baca li ser mili gundîyên çendîn qat zide kirîye... a eva han e edaleta we"(ll).
Têkelbûna bazara Iraqê bi ya sermayedarîya cîhana re, de¬mek bû nerehetîya ji zene'etkarên welat re anîbû. Piştî vê di netîca Şerê Cihana yê Yekem de îngilîzên desthilata xwe di seranserê Iraqê de damezrandin û hinek din deri ji bo berhemê karan xwe vekilin. Her ji ber vê jî hinek din alozî ji zeneetkaran re çêbû. Bi dehan kes ji colayanî (berik, xaluçe, carim çêkerin -Elîşêr.) Bexda û cîyên din ji holê rakirin. Li ba me jî vê bûyerê han tesîrê xwe kir. Colegerîya bajarên me yên mezin ber bi nemana çûn. Sala 1902'yan Mark Syks, di dema gera xwe ya bi nav û deng de, li bajarê Silêmanîyê 150 dikanên çeksazîyê hejmartîye(12). Pişti Şerê Cîhana yê Yekem di hemû bajar û
*10) (The Near East and India), November 23, 1922, PP. 149-150.
(11) El-Firat, hejmar: 5, 2 Muherrem 1339.
**) Binêre: CJ.Edmonds, Kurds, Turks and Arabs. Politics travel and research in North'êastern Iraq, London, 1957, P .80.
156
karwanserayên bajêr de du-sê ji wan mabûn û hatina wan jî ta¬ra beşê jîyana xwedîyê wan a ziktêrîyê tenê nedikir û kara

wan ê serekî jî ketibû ser fişeksazkirinê.
Şerê Ghanê yê Yekem netîcên giran û yên kavilbûnê ji bo pi¬
ranîya navçe û melbendên Iraqê anîn. Herçiqas webalê vî karî
di cîyê îngilîzên de diket ser milê Osmanîyan, lê xelke ewan
nasdikir. Bi sebebê seferberlikê û nemana beşekê zade pez, dewar
û terşan, berhemên zîraeta Iraqê ber bi temambûna şer re
hat li ser çaran yekî berhemên beri. Ji ber vê bahaya dexil û
nan car û nîv heta du car û nîv zade bû. Çay sê hindî û şekir
pênc hindî carên berê bihatir bûn. Wan navçan ku tê de berê
şerê masî ne tiştek bûn, piştî şerê ji ber giranîya masîyan,
hawar ji nîştecîyên wan navçan rabû(13).
Bajarê Silêmanîyê(14) baştirîn nimûna van kavilkirinan e
ku ji ber sebebê Şerê Cîhana yê Yekem seranserê navçê rastî
wan hatibû. Li gor belgên îngilîzên heta şer temam bû, ji 29
mizgeftên bajêr tenê 10 heb (lib) mabûn. Her di wan salan de 3
tekye, 5 hemam, 5 aşê avê, 9 xan, 13 bostan, 16 çayxane, 4 karwanseray,
687 dikan û 1813 xanîyên Silêmanîyê bi tevayî ka¬
vil bûn. Beşek ji van reqemên kavilbûnan gelek ji van jî zêdetir
in. Berê şerê li Silêmanîyê 29 mizgeft, 3 tekye, 31 çay-xane, 11
hemam, 24 aşê avê, 18 bostan, 6 karwanseray û 3205 xanî
hebûn. Yanî ji ber sebebê şerê nêzîkî %21'ê aşan, %45'ê xanan,
nêzîkî %46'ê hemaman, %52'ê çayxanan, %56'ê dikanan,
%57'ê xanîyan, %66'ê mizgeftên, %67'ê karwanserayên,
%73'ê bostanan û ji %100'ê tekyan bi carek kavil bûn. Ji ber vê,
*13) El-Merkezu'l Wetenî Lîhifzî'l-Wesaîq, el- mlf:125/514 (Fich
Tax, 1915-1918).
* ' Ji ber du sebebên serekî me wisa pêwîst zanî ku piranîya belgeyên
ku em pêşkêş bikin bila peywendîya wan bi navçen Kurdistanê

ve hebe. Sebebe yekemin; ji ber ku di derbare navçen din en Iraqê de gelek zade tişt û derbarê navçen alîyen me de jî gelek kêm tişthatine belav kirin. Sebebe duyem jî, ji ber we ye ku em dixwazin bi riya rastîyen ku di ve gotara de hatine nivîsîn sebebên geşkirina agirê tevgera rizgarîxwazî ya we deme ya Kurdistanê bidin dîyar kirin.
157
ne tiştek ecêb e ku nivîskarên vê rapora pêşniyar dikin ku dev ji îmara bajêr bendin û li teniştê wî bajarek nû ava bikin(15). Belgek din a wê demê behs dike ku çawan ji %80'yê xelkê Silêmanîyê bi sebebe şer ya nemane, yan muhacir bûne. Berhe¬mê zîraetî yên wan bi qasî ji pêncan yekî berhemê berê ye, bi¬hayê tenekek genim gihîştîye 1600 rûpî, ya tenekek birine jî gihîştîye 2400 rûpîyan(16). Li gor nivîsandina rojnama "El-'Ereb" a ku îngilîzên wî çaxî li Bexdayê derdixistin, qet di tu bajarek Iraqê ya din de bihatî negihîştîye vê derecê(17).
Gelek ji îngilîzên Avrupî yên pêşkevtî ku hatine Iraqê, xwestine bê ku guhê xwe bidin 'urf û 'edet û esasên dînî, netewî û heta eşîretî yên navçê, wek xwe hereket kirine û ev yeka han jî bûye sebebên teqînen nerizayîyên bêhesab ên biheq di seranserê welat de. Wan dîroknivîsên ku behsa Şoreşa Bîstan kirine(18) di vî warî de gelek nimûne û belge di derbarê navçan Navîn û Başûrê Iraqê de anîne. Ji ber vê di vir de em ê çend nimûnan jî ji alîyê me bînin (Mebest Kurdistan e-Elîşêr).
îngilîzên, di bajarên Kurdistanê de aşkera rê dan gelek kesan ku ne tenê mey, heta esrar jî bifiroşin. Bajarên wisa hebûn ku ne tenê tiyatro tê de danîn, heta 'umumxane (kencane) jî tê de vekirin. Tiyatroya Hewlêrê şerê mezin bi xwe re tîne(19).
"Lawê Çîya"(20) Enwer Mayî wiha dibêje ku hatina îngilîzên

*15) El-Merkezu'l Wetenî Lîhifzî'l-Wesaîq, el-mlf:20/01 (Sulaimaniyah Municipality, 1920).
*16) El-Merkezu'l Wetenî Lîhifzî'l-Wesaîq, el-mlf: (67/17 (Sulaimaniyah, Scarcity).
*17) El-'Ereb, Bexdad, 3 Tebax 1919.
* ' Bi taybetî mamoste Hesenî, Werdî û Feyaz (Binere: Ebdurrezaq Hesenî, El-Sewretu'l Iraqîyye'l-Kubra, el- teb'e salise el-muwessî'e, Beyrut, Şeyda, 1972. El-Dr. Elî el-Werdî Lemhad îctîma'îyye Mîn Tarîxî'l lraq el-Hedîs, el-cuz'u-1 xamis, el-qismu'l-ewwel, Bexdad, 1977, el-qismu'l-sanî, Bexdad, 1978. El-Dr. 'Ebdullh el-Feyyaz, El-Sew-retu'l Iraqîyye'l-Kubra, senetu 1920, el-teb'e sanîye, Bexdad, 1974.
*19) Binêre: Seda el-'Ehrar (rojname), Mûsil, 20 Sibat 1953.
158
li ser exlaqê beşek Behdînîyan tesîrê kir (21).
Ew îngilîzên ku li welatê xwe nimûnên exlaqê nerm in, gelek caran gava ku dibin karbidestê welatên bindestê xwe bi pozbilindî û dilhişkî li gel xelkên wan cîyan hereket dikin. Pi¬ ranîya wan nivîskarên ku behsa Şoreşa Bîstan kirine, çend nimûne di vî warî de anîne. Yek ji wan di bîranên xwe de behsa vê yeka han dike; ku çawan şêxekî Baqube rasta belaya hakimê sîyasî yê bajêr tê. Rojek seyê (kûçikê) hakim xwe nêzîkî wî dike û ew jî ji bo ku se lê nekeve hinek xwe jê dûr dixe. Hakim li kaleşêx vedigere û bi hars jê re dibêje "ya şix, şeyi min ji te gelek paqijtir e"(22). Dîyar e ev gotin ger rast be jî, rewayê gotina nîne.
Efserên îngilîzên bi eynî awayî tiştên wek van li gel xelkê navçan Kurdewarî de jî dikirin. Çi dema Majör Soane bihata

nav bazar, diviya ku hemû ji ber wî rabin û serpîyan bisekinin. Rast e ewî wek Grinhaws ê efserê Necefê qamçî bikar nedianî, lê, bi xwe jî vê yeka han dixwest ku jê re dikirin. M.Soane, mirovên xwe berdabûn pêsîra xelkê bajêr, Ezîz Xan yek ji wan mirovê nexwendeyî req û dilhişk bû, ewî bi pîyên kutayî anîye Silêmanîyê(23).

Çirîskên agirê kirinên ne di cî yên efserên îngilîzên pekîyan gelek kesên makûl ên Kurdistanê. Yek ji wan şêxên Berdeqaremanê nemir bû. Mehmud Cewdetê welatparêz ê bi nav û deng ji ber Soane neçar dibe cîyê xwe terk dike.

Belgên Liqa Musilê ya "Komela 'Ehd"(24) di vî warî de ge¬lek rastiyên hêja parastine. Bi taybetî ewên ku hember şêxên Behdînan bêexlaqîyên efserên îngilîzên nîşan didin. Roja

*21) Enwer el-Maî, El'êkrad fi Behdînan, Mûsil 1960, rûpel: 184-185.

(22)

v ' Binere: Talib Muştaq, Ewraq Eyyamî, el-cuz'ul-ewwel, Beyrut, 1968, rûpel: 91.

*23) Binere: Pêşkewtin, 6 Mayis 1920.

*) Cem'îyyetu'1-Ehd", yek ji wan komelên sîyasî bû ku rewşenbîrên 'Ereban, damezrandin. Piştî şer cîyê îdara bilind a Ehd li Şame bû. Liqa Musilê ya Ehd, yek ji wan liqên herî aktîf û dilsoz bû ku piranîya endamên wê heta dawîyê paqij man.

159

14'yê meha tebaxa sala 1919'an, Liqa Musilê ya Komela 'Ehd di derbarê ezîyetdana Neqşîbendîyan, nameyek dişine baregeha bilind a komela ya bajarê Şama. Berpirsîyarên Liqa Mu¬silê di nama xwe de wiha dibêjin:

"Em bi temamî dilteng in ji ber van şixan ... Ger hemû serok bi kori pi wan de necin, yan wek dixwazin mil nedin ber hakîmîyeta zvan, îngilîz dixwezin atvakî biperiva serî li hemû serbilindan nizm bikin û eziyete bidin tvan, . Eyni wexti çavin wan ba hilnagire kesek xwedî desthilat i wek cenabi Şex Bahaddîn Efendiyi Neqşîbendî bibinin ku nikarin bikin daridesti xwe"(25).

Hemû li ser hev du hefte li ser de derbaz nebûye Liqa Musilê ya Komela 'Ehd a nameyek taybetî ya din dişine Şama û vê. hedîsa xwarê digihîne baregeha bilind a komela:

"Çend roj beri niha îngilîzên li Hezoliri, Seîd Axa kuri wî û grubek hevreyin wî bi tohmeta kuştina çaiouşekî îngilîz û birindarkirina du polîs û du cendirman girtin. Yek ji polîsan îngilîz û yin din jî Iraaî ne. Her wiha qismek ji mirovin Seîd Axa jî birîndar bûn. Ev hedîsa han li ser wi yeki qewimî ku rojek beri vi di tîyatroyi de çamuşek li kuri Seîd Axa xistîye û gelek xeberen ne di cî de ji re gotine"(26).

Zorî û tehdaya îngilîzên bê cihêkirina sinif û tebeqan li ser herkesi ye. Liqa Musilê ya Komela 'Ehd di roja 8'ê Çirya Duyem a sala 1919'an di namek xwe de wiha nivîsandîye:

"Qet tu zordarîyek nemaye ku dagirkerên hember xelke bi¬ kar neynin. Kimtirîn cezayi şaşîtîya her kesek dibe sebebi lexistina wî bi dar û copan, gelek caran ew kes di xwîni de dikemilin û cîye qamçîyin wan demek dûr û direj dibe nişan û bi iaşen tvan ve dimine. Wisa li xelki hatîye; cezayi peran ku dibe mezintirîn qezenca dagirkerên, di cîyi lixistini de ji wan re ev karen nizm, wek nimet e. Xwezî ew in ku îngilîz man gunehkar dike tiştên tine sere wan ev tene bunal Gelek kes ki¬

rine zindanan bi ku gunehek li ser wan ispat kiribin, yan ji
*25) Seda el-Ehrar, 13 Sibat 1953.
*26) Seda el-Ehrar, 20 Sibat 1953.
160
dadgehek biryare girtina wan dabe. Wek mîsal, 18 Goyî(27) girtine, bi ku tu peyivendîyek zvan bi wi bûyere ve hebe ku di nav çîyayin wan de qewimî. Ev Goyîyin han va demek e li Musili bi hemalî dijîn. Ev Goyîyin han heta ku cîye Kolonel Lîchmen neguhertin, Dilim û Kapîten Bili di cîyi wî de neşandin, wî li ba xwe girtî hiştin"(28).
Karbidestên wê demê yên îngilîzên çend car ve yeka han qebul kirine ku cure grubek ji efserên wan bûne sebebê peydabûna nerehetîyên zade di nav piranîya xelkên lraqê de. X.Bill e bi nav û deng(29) ku li gor piranîya hevrêyên xwe gelek qenc jî bû¬ ye, çend caran di nivîsandinên xwe de van rastiyan nişan da¬ ye. Ji vê jî girîngtir raya General A.L.Haldane ye ku ew bi xwe qumandarê (fermandeyê) wan eskerên bû ku wezîfa tefandina Şoreşa Bîstan li ser milê wan bû. Haldane, kirinên ne di cî yên efserên îngilîzên yek ji sebebên serekî yen Şoreşa Bîstan hesêb dike(30).
Eynî wextî ev rastiyan han di belgên şoreşa de jî tên xûyakirin. Rojnama El-Firat a dildax, wisa lêhatîye ku webalê he¬ mû xirabîyên û zeptkirinên kun û quncikên dîroka jî dikir ser milê lngilzan. Wisa lê hatîye ku ji bo tarîtiya Qerna Navîn silavên hurmetê tine , Fir'ewn, Cengiz Xan, Tîmure Leng û Hûnên xwînrijên Awrupayê. Ji ber ku wek dibêje; "Xwedi, tu bi xwe agahdar i, ew bi hestin xwe naziktir û dilen xwe ve baştir bûn ji îngilîzin zordaren barbar "(31).

(27)
v ' Mebest jê endamên Eşîra Goyan en nişteciyên Bakurê Zaxo ne. Goyî, yekemin eşîr bûn ku li Iraqe dijî îngilîzên çek hildan.
*28)Sed el-Ehrar", 3 Nisan 1953.
* ' Mebest jê Mis. Bili e ku li Iraqe karbidestekî mezin e îngilîzên bû. Car carnan bi navê "şajînî be tac" (jina bê tac Elîşêr.) hatîye binavkirin.
*) A.L.Haldane, The Insurrection Mesopotamia, Edinburgh, 1922, PP. 20-21.
*31) El-Firat, hejmar: 4, 13 Zulhecce 1338.
161
Çi Ereb û çi Kurd, li ba Iraqîyan wisa bû ku li gel nemana selteneta Osmanîyan û hatina îngilîzên ve çirîskên şaristanîyetê û nî'metên xwendevarîyê dê bigihîje hemû quncên welat. Bêguman her çawan be ji ber gelek sebebên aşkera bindestiya îngi¬lîzên xelkê ji bindestiya Osmanîyan zêdetir nêzîkî jiyana şa¬ristanîyetê dike. Le, bi sebebê wî bara yekcar giran ê ku Şerê Cîhana yê Yekem xist ser milê hemûyan, asteng ketin ser riya vê bûyerê han. îngilîzên bi zû tiştek wisa ji wan re nekirin, xelk jî bi lez bû. Ji ber gelek sebebên tevlîhevî, rewşa xwendewarîya welat di salan pêşîn ên piştî şerê paş de çûn. Hemû perên ku îngilîzên di sala 1919-1920'an de ji bo kar û baran xwendinê tehsîs kirin, 70 000 lîreyê Osmanî bûn, yanî du qatî wî pereyê ku Osmanîyan sala 1911-1912'an de, tenê ji bo Wi¬layeta Bexdayê dan jî nebû. Ji ber vê, ne tiştek ecêb e ku hejma¬ra hemû dibistanên Iraqê bû bi qasî hejmara sala 1914'an. Kar gihîşt wê derecê ku îngilîzên li bajarekî wek Musilê hejmarek dibistanên seretayî (mekteba ewilîn), navîn (orte mekteb) û fêrgehekê (enstitutî) amadekirina mamostan girtin(32).

Kar û baran xwendinê li navçan Kurddistanê hîn jî xirabtir bûn. M.Soane, ji bêtirî 3 000 000 rûpî ku qezencên navça Silê¬manîyê bi xwe bûn, tenê 63 000 rûpî ji bo kar û baran xwendinê tehsîs kir. Yanî nêzîkî %2'yê qezenca navçê û bîst car ji wî pe¬re kêmtir bû ku ji bo polîs û pasewanên xwe yên taybetî xerc kir(33).

Van cure kirinên han tesîrek wisa kir ku di destpêka hakîmîyeta îngilîzên de xwendina kurdî, ber 'eksê wê ku wan çaverêdikirin, paş de ket. Pişti temambûna şerê, îngilîzên te¬nê dibistanek destpêkî li Silêmanîyê vekilin. Demek berê şer di eynî bajarî de du dibistanên seretayî, yekê navîn û fêrgehek zabitiye hebû ku hejmara xwendevanên wan bi ser hev 330 kes û hejmara mamostan jî 20 kes bûn. Di dawîyê salan 20'an de

(32) E1.-Ereb/ 13 Tebax 1919/ "Sed el-Ehrar", 3 Nîsan 1953.

*) Li gor wan hejmarên hatîye hesab kirin, ku Majör Soane ji xwe re di rojnama Pêşkewtin de belav kirîye (Binêre: Pêşkewtin, 23'ye Kanuna Yekem a sala 1920'an).

cardin li Silêmanîyê tenê 10 xwendevanên navendî hebûn, yanî 16 car ji hejmara sala 1914'an kêmtir bûn. Wê demê hej¬mara xwendevanan ên di dibistanên Kurdan de li seranserê Kurdistanê Iraqê, 1545 kes bûn; di hemberê vê de 6 300 kes di dibistanên îsayîyan de û 8 400 kes jî yen Cihûyan de dixwendin(34).

Rast e, ew ên ku hesabekî wiha ji bo vî milê jîyana rewşen¬bîrî ya wê demê dikirin kêm bûn, lê yên qîmetê pê didan, yanî rewşenbîr û entellektuel û aktîvîstên civakê bûn ku di destpêkî de bi hatina îngilîzên dilgerm bûn.

Di nav sebebên berhevbûna nerizayî ya Ereb û Kûrden Iraqê de, ji derveyê sebebên ku heta niha me behs kirin, cîyê hestê ayînî yekcar mezin û dîyar e, bi derecek wisa ku li gor hinek dîroknivîsên lraqe ev sebebê yekemin ê veketina agirê Şoreşa Bîstan e. Gelek kes bi çava kafir û zindiqîyê li îngilîzên dinêrîn, heta pişti ku wan xwarin dixwarin di pê wan de firaqên xwe tehfîl dikirin. Gelek ên wisa jî hebûn ku hîn meyla Sultan Reşad ê "Xelîfê Musilmanan" dikirin. Di vir de rola cure grubên îngilîzên bi xwe jî kêm nebû. Heta Osmanî li Bexdad bûn, wan kincên pişteva nîya Musilmanîyê li xwe kiribûn(35), lê dema ku şer temam bû û gihîştin armanca xwe, ketin xaçperestîya xwe ya carên din û xwe gelek nêzîkî îsayî û Cihûyan kirin. Rast e îsayî û Cihûyên wî çaxî yên lraqê, ji ber gelek sebebên ji musilmanan xwendatir bûn, lê ev ne sebebek tik û tenê bû ku piranîya efserên îngilîzên han dida da ku tenê pist li wan girê bidin.

Li ser van tevan re, herçiqas mirov nikare wan biparêze, le piranîya karbidestên îngilîzên nedizanîn çawan têkilî bi şêx û melan re deynin. Destê hejmarek ji wan gihîşt rojên wan ên bên jî. Efserên wisa yên xwîngerm hebûn ku aşkera gawurçîtiyê

*) Derbarê serokanîyên lekolînên li ser van hejmarên, binêre: nota hejmara 63'yan a beşe yekem a kitaba Dewru'l Şe'bu'l Kurdî Fi Sewretî'l-
'

Eşrîn el-Iraqîyye" rûpel: 44-45.

(35) Di hejmarên El'êreb û Têgeyîştinî Rastî de nimûnên ispata van rastiyan pirr in.

dikirin. Wek Longrigg(36) ên wisa jî hebûn ku xwe mîratgirê "

ala şaristanîyetê tenê (çerm) spî ya Avrupa dihesiband. Wan Selaheddîne me û Şêrdilê(37) xwe bibîr anîbûn.
Ji bo ku em bikaribin baştir vî milê han ê meselê ronî bikin, divê em serî li wan gotinên rojnama El-Firat ku di vî warî de nivîsandine, bidin. Di hejmara 4'an de El-Firat bi aşkera xwîn ji dilê xwe dibarîne dema ku dibêje:
"Ji me re bijin kîjan deivleta azad ji xeynî Ingiltere Mewlud li me qedexe kirîye, kîjan karbidesti idarî yan sîyasî yan es¬kerî ji xeynî seroken îngilîzên cûret kirîye dest teke nav kari ve 'edeta cîgirtî? Ka bijin mirovekî sîyasî yan idari yan es¬kerî heye ku ewqas hov be, hezbike henekan bi mafi azadî yi giştî bike? Li gelo şermî nîne li gel van tevan de jî îddî'a şaristaniyeti bike? "(38).
Ez bawer nakim narin û fermanên mirovên dînî yên Başûr dengek a bi wî awayî di alîyê me de derketibe. Lê ez vê jî ba¬wer nakim ku feqî û melayên Kurdistanê bi hatin û hakîmîyeta gawuran razî bibin. Car û caran rojnama Pêşkewtin jî êrîş û tehdayen karbidestên îngilîzên û biryarên wan ên derbarê qedexekirina çivin û xwendina Mewludê di nav mizgeftên Bexdayê de belav dikir. Di hejmarek xwe de Pêşkewtin, piştî belavkirina êrîşên zade yên bi van babetan ên Wilson li Bexdadê, zû bi zû ducarî dikir. Pêşkewtin, xeberê xeniqandina "çar mufsîd" jî çap kirîye(39).
(36) Longrigg yek ji wan efserên sîyasî yen Ingilîzan bû. Çend sal Kerkûk di destê wî de bû. Di nivîsên xwe de bi hêsanî meyi bi wan cure bîr û bawerîyên nijadperestî dikir, bi taybetî di wê kiteba xwe ya bi navê "Iraq ji Sala 1900'an Heta Sala 1950'an" de. (Binêre: S. H. Longrigg, Iraq 1900 to 1950, A. political, social and economic history,

London, 1953).
*37) Mebest jê Richarde Yekem ê qrale îngîlistanê ye (1189-1199) ku beşdarî êrîşa sayem a xaçperestan bû û nêzik ve peywendî bi Sela¬heddîne Eyyubî re danî.
yM> El-Firat, hejmar: 4, Zulhecce 1338, hêjayî gotina ye ku nîvê vê hejmara han a rojnama El-Firat li ser vê behsê ye.
*39) Binêre: Pêşkewtin, 19 Tebaxa 1920.
164
Şoreşa Bîstan, ji wan cure bûyeran nebû ku bikare ji hindurê welat an ji derve bê birrîn(40). Ew kesên ku hewle wiha bidin ne qîmeta Şoreşa Bîstan û ne jî qîmeta tu tevgerek azadîxwaz ên din berz yan nizm dikin, giranî û qîmeta raya kesen wisa tûne ku mirov xwe bi bersîvdana wan re aciz bike. Hêjayî ew qas zehmetîyan jî nîne ku mirov xwe bi wan re biwestîne ku dixwazin bi bêjîngê tîrêjên rojê li ser me de qut bikin.
Li gor qanunek dîroka, qet bûyerek nîne ku di hecmek yan qalibek teng de bimîne û ji der û dora xwe bê qutkirin. Çi belgên şoreşa, çi belgên îngilîzên û çi jî lêkolînên gelek dîroknivîsên demek e vê yeka han îspat kirine ku:
1) Serîhildana di nav cergê Kurdistanê, li gor qene'eta me, yek ji wan sebebên girîng e ku ji bo destpêkirina Şoreşa Bîstan rê vekir.
2) Şoreşa Bîstan, di nav gelek navçen Kurdistanê de deng daye û tesîr kirîye. Heta eşîrên wisa hebûn ku hîn hestê neteweyî serdarên wan nehejandibûn, lê ew serdar û bi mirovên xwe ve ji ber gelek sebebên ji îngilîzên dildax bûn û ji tevlîhev a sala 1920'an firset dîtin ku jî ji ber xwe ve bikevin gîyana dagirkerên.

3) Tevgera netewî ya Ereban li Misrê, Şama, Hicaza û di da¬
wîyê de tevgera rizgarîxwaz a Kemalîstan li Tirkîyê û ser¬
kevtina yekemin şoreşa sosyalîzmê di cîhana de, di hîşyarbûna
rewşenbîrên Iraqe û ruswakirina dewletên emperyalist
de rolek mezin lîstin.
Ev nimûne û belgên ku me behs kirin, hinek in ji bênderek, lê
li gor bawerîya min ji bo ronîkirina dîroka sebebên Şoreşa
Bîstan bes in, Diyar e bûyerên ku ji sebebên wisa derkevin, dê
neticeyên wan jî mezin bin.
*) Hin nivîskar dixwazin bi zorî Şoreşa Bîstan bixin nav qalibek
teng (wek mîsal binere: Settar Cebîr Naşir, Hewamîş 'Ela Kitabî 'Elî
el-Werdî Lemhat îctîma'îyye Mîn Tarîxî'l Iraq el-Hedîs, el-cuz'u'lxamis,
Bexdad, 1978, rûpel: 74-85. El-Rasidu'l Teqeddumî, Sewretu'l
'Eşrîn, El-Bu'udu'l Qewmî wel Ehdafu'l Wetenîyye, -"El-Iraq", 29
Huzeyran 1978.
165
2 - NETICA ŞOREŞA BÎSTAN
Wek belav e ne tenê ji roja 30'yê Hezîranê, yanî wê roja ku
Şe'lan Ebu'1-çon ê serokeşîrê Zewalmî hat girtin û mirovên wî
wî azad kirin, lê ji destpêka bihara sala 1920'an ve şoreşa
gelê Iraqê li dijî îngilîzê dagirker li Bexdad, Necef, Kerbela
û cîyên din serî hilda. Di hemû alîyan de civîn û xwenîşandanan
destpê kirin, sencwebûnî bû slogana (şî'ar) rojane ya xebata
xelke. Heta dor û berê dawîyê meha Hezîranê serîhildana
gel ji bajarên gihîşt gundên û merkezên eşîrên çekdar ên Firatê
Navîn. Ji wir şûn de qonaxek nû di awaye xebata girsen xelkên
welat de destpê kir û çend meh domand. Li gor gelek seroka¬
nîyên hejmara wan ên ku di rîya rizgarîya welat de destavêtin

çek, ji 130 000 kesan zêdetir bû.
Şoreşgeran, karîn hejmarek bajêr û beşê herî zade ya melben¬
dên Firatê Navîn azad bikin. Necef, bû bingeha serokatîya
şoreşa. Heta destpêka Tebaxa sala 1920'an, çirîskên agirê gi¬
hîşt Baqube, Dêtawe, Şareban, Delê Ebbas û ji wir ve êdî ber bi
alîyê me ve belav bû. Eşîra Delo ya navça Xaniqîn û Kifrî di
bin serokatîya Kerimî Xesrew Beg û Birahîm Xan, li ber dij¬
min baş dest hildan. Her wan rojan de hejmarek navçe û eşîrên
din ên Kurdistanê wek Leylan, Zengene, Dawide û Surçî
serîhildan. Hewlêr wisa têkel bû ku Arnold Wilson neçar ma
Bexdad bi cî bihêle û bi firokeyek taybetî biçe wir(41).
Rast e, ji ber gelek sebebên îngilîzên karîn bi zora çekên
kuştinî yên nû Şoreşa Bîstan bitefînin, lê ev tefandina han liser
wan gelek giran runişt. Hejmara serbaz û zabitên îngilî-zan
ku di şer de hatin kuştin yan bê ser û şûn man 1041, a birîndaren
wan jî 1228 kes bû(42).
*) Mihemmed Mehdî Besîr, Hesenî, Feyaz, Werdî, Katlov, Haldane
û hejmarek nivîskarên din ên ciyî û bîyanî, bi dirêjî behsa serpêhatîyên
şoreşa kirine. Min jî li gor imkana xwe di kiteba xwe de
bûyerên Kurdistanê ronî kirine.
* ' Serokanîyên îngilîzên, 1041 kuştî û kesên windabûyî dikin du
beş; 426 kuştî û 615 windabûyî.
166
Wê demê ku Londra ji bo quruşek dikarî bifirya, tefandina
Şoreşa Bîstan nêzîkî 100 milyon pawan li ser wan mal bû(43)
ku ji bo destpêka salan 20'an û rewşa aborî ya dawîyê şer mesrefek
gelek zade bû. Lê, piştî tefandina şoreşa jî Ingilîzan ji
tirsa carek din berpabûna wê, naçar bûn eskerek mezin di nav

lraqê de bihêlin ku xercê wê barek zade giran bû. Tenê di ye¬
kemin sala piştî tefandina şoreşa de xercê vî eskerî gihîşt nê¬
zîkî 21 milyon pawe ya zêr(44).
Şoreşa Bîstan mezinîya xwe di vir de îspat kir ku dagirker
naçar kirin da ku di sîyaseta xwe ya beramberê lraqê de çend
gav paş de bavêjin. îngilîz baş bi wê têgihîştin ku nikarin serxwebûnîya
gelê lraqê bidin bin pêyên xwe. Her zû hawar li
Asquith e serokwezîrê berê yê Britanya rabû û di salona par¬
lamentoya de bi aşkera daxwaza kişandina eskerên welat ji
Wîlayeta Musil û Bexdayê kir. Rojnama "Observer" a bi nav û
deng roja 23'yê Tebaxa sala 1920'an derbarê eynî behsê de
wiha nivîsandîye:
"Jibîrkirina wan wezîfên serekî yên ser milên me dexma qanunên
me ne li ser gelek de ku me bê heq û sebeb bi wan daye
zanîn, pêwistiya bi vî awayî danezanînek nîne, ji ber ku ev
kara han tiştek pêkenînê ye".
Eynî rojê "Sunday Times" ku ev jî rojnameyek din a bi nav û
deng a Londrayê bû, daxwaz ji karbidestên kir ku sîyaseta xwe
ya sernekevti ya lraqê qebul bikin û dest ji pêsîra xelkên wî
berdin.
3 - OjMETA ŞOREŞA BlSTAN
Ew ên ku heta niha me di derbarê sebeb û neticên Şoreşa Bîs¬
tan de gotin, balkêşana yekemin a qîmeta zade ya wê bûye-ra
mezin e, di tomarên dîroke de. Çi tevgerek şoreşger a ku pist
) P.W.Ireland, Iraq. A.Study in political development, London,
1937, P.273.
*) Binere: B.M.Dantisg, Do û îro Iraq , bi zimanê Rusî, Moskova,
1960, rûpel: 24.

167
bide bi dehan hezar kesan û biçe nav kûrahîya xebatê û bi hezaran kes sera xwe jê re bikin qurban divê ku serpêhatîyek dîrokî ya bi qîmet be. Piranîya serokanîyên di wê bawerîya de nin ku zerarê şoreşgeran digihîje nêzîkî 8 450 kuştî û birîndaran. Dibe ku lêkolînek fireh hejmarek zêdetir derîne. Belge û nîşanên hejabûna mezin a Şoreşa Bîstan, di vê yeka han de ne ku Şoreşa Bîstan yekemin bûyerê mezin a dîroka nû ya lraqê ye ku Ereb, Kurd, kêmayetî('ekalîyet) yên musilma¬nan şu, yên mezhebên sunnî û îsayî di sengerek de civandîye. îngilîz, roja ku pê xwe danîn nav axa lraqê şûn de, ketin avêtina tovên dijîtî û nehizîya karan wisa. Li gel vê jî di sala 1920'an de vî tovê han berek wisa nedayê. Di eksê daxwaza efserên îngilîzên û planên wan de, roja I4'yê Gulana wê sala, yekemin civîna mûşterek a azadîxwazên sunnî û şîîyên Bexdadê li Mizgefta Qûblanîye ya nav Bazara Bezazan çêbû. Vê civîna han ava destpêkî ya hêja di dîroka lraqê de rijand ku wê demê hemû dilsozên têgihiştî tînîtiya wê dikêşa. Edî ewqas têt zanîn, xelkên hemû alîyan ên Bexdadê di civînên mezin de têkilî nav yek û du dibûn û hemûyan bi yek dengî daxwaza sencwebûn û azadîyê dikirin.

Ji vê jî zêdetir, di wan rojan de welatparêzan Bexdadê pêhesîyan ku karbidestên wir di rîya du-se kesên kirîgirti yên musilman re, planek çêdikin û dixwazin êrîş bibin ser şayîyek dînî ya îsayîyan. Li ser vê, bi yekser hejmarek gelek zade xelk dicivin û bi ala kesk a bi gulan ve xemilandî berê xwe di¬din dara Kildanîyan û li wir têkelî nav birayên xwe yên mezin dibin û bi hev re dikevin zikr û tehlilî li ser îsa û Muhemmed

hawar ji bo serfirazîya gel û welat dikin.
Cardin hîn ji vê jî peştir, yek ji wan raporên nihênî yên wê demê yen polise Bexdadê ye ku behsa vê yeka han kirîye ku çawan gotebêje Şoreşa Mihemmed Mehdî Besîr(45) di wextê civîna şeva 16'yê Hezîranê ya li Mizgefta Seyîd Sultan Elî
*) "Gotebêje Şoriş" bûye naznave Mihemmed Mehdî Besîr ê ku yek ji serokên xwîngerm en şoreşa gelêrî ya Bexdadê bû. Mamoste Refîq Hilmî di "Yadaşt" de gelek qîmet pe daye.
168
de, ji xelkê re digot ku, "ji Cihûyan re bijin û wan dilxweş bi¬kin ku kesek xwe nizîkî dikanin wan nakel".
Şoreşa Bîstan di rîya sencwebûnê de yekem tevgera şoreşgerî û rizgarîxwazî ya hemû gelên lraqê bû ku serokatî û dezga îdarî, eskerî û organ û çapemenîya xwe ya taybetî hebû. El-Firat û El-lstîqlal, di dîroka rojnamegerîyê lraqê de rûpelên yekcarî dîyar û şewqdar in (46).
Ji derveyê hemû van tiştên ku me behs kirin, dîroknivîsên peşkeytîxwaz jî di vê bawerîya de nin ku Şoreşa Bîstan bûye kevire bingeha yekîtiya xebata mûşterek a Kurd û Ereban a dijî dagirkerên û bi vî awayî ji bo vebûna deriyê sîyasî gelêrî ya herdu milan rê çêkirîye û baştir bi vê yeka han têgihîştîye ku dijminên wan yek in(47).
Herçiqas dijmin karî Şoreşa Bîstan di xwîn de bikemilîne, lê eynî wexti neçar jî bû ku di netica dexta wan tirsan de, serî ber hejmarek daxwazên wê demê yên gelê traqe bitewîne. Guherîna Arnold Wilson ê ku lraqî ji hemû karbidestên îngilîz zêdetir ji wî dildax bûn û di germîya şoreşe de şandina Percy (Persî) Koksî li Bexdadê, cure paşdekişanek taktîkî bû, ku

îngilîzên berê berpabûna agirê Şoreşa Bîstan bibîr nedianîn. A wê dereng an zû yek ji kûren Huseyn ê Şerîfê Mekkê bibûya paşaya lraqê, lê guman ji vê yeka han jî naye kirin ku Ingilîzan ji ber sebebên Şoreşa Bîstan, bi lez tac û textê şahîyê pêşkêşî Feyselê Yekem kirin. Çunkî ew gihîştin wê bawerîya ku diviya lraq di riya "paşayek û hezar şixan ve" bihata îdarekirin, ne di riya hejmarek zade ya eskerên ku barek ge¬lek giran dikir ser bacdarên Britanya.

* ' Ji bo dirêjahîya vê behse binêre gotara ku bi navê "Mîn Tarîxî Sehafetî Sewretu'l 'Eşrîn", di rûpelên 35-70'yên kovara Drasat Fî'l-Tarîx we'1-Asar, Bexdad, el-'ededu'l-sanî, 1982 de hatîye belavkirin.

* ' Binere: "Iraqa Hevdem", nivîsa grubek Rojhilatnasên, bi zim¬anê Rusî, Moskova, 1966, rûpel: 135.

(lraq Review), Vol.l, No: 6, July 2, 1959, P.3.

169

Ji yekemin roja destpêka Şoreşa Bîstan şun de, deng û behsên şoreşa li seranserî lraqê, Rojhilata Navîn, di nav sîyasîyên Awrupayê û Amerika Yekgirtî de deng daye. Wek me dît, xeberên şoreşa gelek zû ketine ber destan sîyasîyên û li ser rûpelên rojnamên Londrayê. Arşîvên taybetî yên Ingiltere, Frensa û Hindîstanê, tijî bi sedan belge û raporên nihênî yên gelek milên şoreşa ne, lê çi heyf ku heta niha jî kêm ji wan ke¬tine destan dîroknivîsên.

Li gor bawerîya min cî û giranîya sala 1789'an ji bo dîroka nû ya Fransayê çi ye, cî û giranîya Şoreşa Bîstan jî ji bo dîroka hevdem a lraqê ew e, ji wê kêmtir nîne. Ji ber vê ez bi dilek pak dibêjim ku yê me heta niha ji bo Şoreşa Bîstan kirîye, ge¬lek ji qîmeta wê ya rastî kêmtir e.

170

MIJARA YANZDEHAN

LI SER SERÎHILDANA MEZIN

A KANUNA DUYEM A SALA 1948'AN

ÛCIYE GELE KURD

Di WE SERÎHILDANE DE

Dîroka nû ya hevdemî ya lraqê tijî ji rûpelên xebata xwînavî ya dijî dagirkerên bîyanî û kevneperestîya hindur e* '.

Yek ji van rûpelên pîroz, serîhildana mezin a Kanuna Duyem a sala 1948'an e ku îro ji her wextî zêdetir, pêwîst e em ji der¬sen wê yên dîrokî ya mezin feyde werbigrin û bi awakî zanistî û fireh bikolin.

Ji bo ku em bikaribin bi awakî durust çarçova Serîhildana Kanûnê bidin dîyarkirin, pêwîst e em çavek li wan guherînên mezin en di rojên Şerê Cîhana yê Duyem û salan piştî wî de yên di wan awa û guherînên ku naveroka xebata rizgarîxwazî û jîyana civakî ya lraqîyan de çêbû, bigerînin.

Demek gelek dirêj berê Şerê Cîhane yê Yekem, derebegî wek

(*) Di kovara Birayetî, hejmar: 11, sal: 1, cilda duyem, nîva Sibata 1971, rûpel: 4-15'an de hatîye weşandin.

171

rejimek aborî û civakî ber bi têkçûnê de bû û di pêşîya pêşkevtina sebebên wasitên berhemdarîyê de bibû asteng. Ji ber sebe¬be kêmterkexemî (nemelazimî) û bîrtengîya nûnerên wê li alîyek, li alîyê din jî ji ber awayê peywendîya berhemdarîyê, vê rejima karek wisa nekiribû ku di destê cotkar û xwedî axên biçûk de waridatek bimîne ku ji jîyana xwe ya rojane zade bike û bikare vê zade waridata han ji bo berfirehkirin û pêşxistina

wasitên kara xwe texsîs bike. Li ser vê de jî Osmanîyan û piştî wan jî îngilîzên, ji bo xwe, gelek milên vê rejima ragirtin, cîyê peyên xwe qahîm û desthilata xwe xurttir kirin. Vê yeka han demek bû dijîtîyek di navbera axa û gundîyên de çê kiribû.
Ji ber çend sebebên, di salan Şerê Cîhana yê Yekem û piştî vî serî de, pelçiqandina derebegî ji carên din zêdetir bû, ev jî bû sebebê kûrbûna dijîtîya nava xwedî ax û gundîyên. Ev yeka han bû sebeb ku gundî tenê dagirkerên bîyanî ji xwe re dijminê rasteqînî nebine, belko eynî wextî kedxwerê hindur jî wek dij¬min bibîne. Netica sîyasî ya vê bûyerê jî ji bo rojên ben hindik nebû.
Lê ji vê jî mezintir ew guherînên mezin en girîng bûn ku li ba¬jarên eynî wextî rû dan û bûn sebebê wê yeke ku jîyana civakî û xebata netewî ya lraqîyan bikeve nav çarçovek nû. Piştî Şerê Cîhana yê Yekem û bi taybetî piştî xelasîya salan 20'an şûn de, sanayîya netewî ber pêş de çû. Gavên mezin ên pêşde çûna waridata sanayîya netewî, di salan Şerê Cihana yê Duyem de çêbû, wê demê ku ji ber sebebê şerê bazara lraqê ji bazara sermayedarî qut bû, bû mercek li bar ji bo kesên xwedî perên mezin ên bajarên ku bi dilxweşî bixin saha berhemdarîyê sa¬nayiye. Netica vê yeka han jî giranîya burjuvazîya netewî, çi di jîyana aborî û çi jî di jîyana sîyasî ya welat de ji carên din zêdetir kir.
Di milek din de jî ev bûyerê han bû sebebê zêdebûna hejmara çîna karker. Van çend sebebên taybetî tesîrek wisa kir ku gi¬ranîya ve çînê di çend alîyan de, heta ji giranîya çîna burju¬vazi ya netewî jî zêdetir be. Wek mîsal, di salen Şerê Cîhana ye Duyem de, tenê hejmara wan karkerên ku di bingehên es¬

kerî yen îngilîzên de kar dikirin, nêzîkî 70 000 kesan bûn, ev hejmara han %35'ê tev wan karkerên pêkdianî ku di hemû
172
karan sanayîya de dbcebitîn* '.
Lê ji ve jî girîngtir ew guherînên kûr bûn ku ji destpêka salan 30'yan ve, di naverok û awayê fikirîn û tevgera vê çîna mezin a civakê de destpe kiribûn. Di destpêka çêbûnê heta nîvê sa¬lan 30'yan ev beşê civakê, tenê ji "ber xwe ve çîn" (çînek le xwoy da - class in it şelf), yanî tenê çîn bû. Di warê sîyasî û ci¬vakî de pêşengîya kar di destê çînên din ên welat de bû. Heta fermanrewayên wan çaxan jî dixwestin jê istifade bikin û bikarin bikin daran destê xwe. Bê sebeb nebû ku di dawîyê salan 20'an de yekî wek Cafer Eskerî çend car di nezdê Komela Ge¬lan de bûye "nûnerê" karkerên Iraqê. Ev yeka han di nîvê sa¬lan 30'yan de yekcarî guherî, ji vir şun de êdî hêdî hêdî karke¬rên Iraqê ketin nav qalibê "ji bo xwe çîn" (class for it şelf)*).
Netica van guherînên han di salan Şerê Cîhana yê Duyem de bi awakî xweş derket û xwe di zincîrek grev (karberdan) û sloganan (şîar) de da pêş. Demek kêm pişti şerê jî greva mezin a Gawirbaxî ku di destpêka havîna sala 1946'an de qewimî, bi tevayî îspat kir ku çawan karkerên Iraqê bi yekcarî bûn çînek ji bo xwe.
Ev cure guherînên han herdem neticên mezin bi xwe re anîne, bi taybetî nîsbet tevgerek rizgarîxwazî ya civakek be. Bi
(1) Binere : (Kingdom of Iraq), by a committee of Officials, Balti¬more, 1946, P. 108. Her wiha binêre: El-Şerare, el'ededû samin, Huzeyran 1944, rûpel: 2.
(2) "Ber xwe ve çîn" û "ji bo xwe çîn", du gotinên zanistî ne, ku heta

niha di zimanê Kurdî û ez bawer im di zimanê Erebî de jî nehatine bikaranîn.
Endamên hemû çînen karker di destpêka çêbûnê de û heta demek dirêj belav in, hîssa wezîfeyen civakî û sîyasî yên ser milê xwe nake. Diqqeta xwe nakişîne li ser yekîtîye di beranbere çîna ser¬mayedar û rejimên sermayedarî de û tevger û serîhildanên wan en çedibin û heta gelek car pêşengîya kar û aktivîtên wê di desten çîn û tebeqen din de ne. Di ve qonaxe de çîna karker tene "ber xwe ve çîn"ek pekhatî ye. Le piştî ku ev bûyerên han tev diguherin û karker hîss bi erken civakî û sîyasî yên ser milên xwe di nav temama civakê de dike, ew çax ev çîna han diguhere û dibe "çînek ji bo xwe", yanî êdî ne dara deste kesek e û ji wê rewşe xelas dibe û ji bo xwe şer dike.
173
nîsbet wan civakan e jî ku ji neteweyek zêdetir pêkhatine. Ev guherînên han ji wan re dibin maya (hêvîn) kêmbûna dijîtî û nakokîya neteweyî ya nav wan, bi taybetî ya nav çîna serdest.
Bi vî awayî gava ku Şerê Cîhana yê Duyem temam bû, giranî û mizana çînîti di nav civakê Iraqê de gihîştibû dereca şertên kemla guherînên sîyasî yen mezin. Ev rewşa ku bi xwe re xistina enîya faşîzmê ji bo seranserê cîhana anî, jê re bû sebebekî alîkar ê girîng. Karbidest, neçar bûn heta dereceyek mil bidin ber daxwazên demokratik ên gel. Roja 23'yê Sibata sala 1946'an Tewfîq Siwêdî, yekemin wezareta piştî şerê damezrand ku du kes ji nûnerên burjuvazîya netewî tê de beşdar bûn. E yekem Se'd Salih e û bû wezîrê hindûr, yê duyem jî 'Ebdulwehab Mehmud e ku ew jî bû wezîrê Malîyê.
Di wê programa ku Serokwezîr roja 5'ê Adara pêşkêş kir de, dewleta gelek sozên sîyasî û aborî didan xelkê. Ji van a herî

girîng guherîna peymana sala 1930'an a di navbera Iraq û Britanya de bû ku diviya bi awakî li gel "rewşa nû ya cihana û programa Komela Netewên Yekgirtî re" li hev bê. Maddeyek din a programa, li ser belavkirina axa dewleta bi ser gundî û cotkaran welat de bû. Kabîna nû, pişti mehek li ser demazrandina xwe re, biryara ji holê rakirina îdara 'urfî da ku ev ji Hezîranê sala 1941'an ve hatibû danîn. Eynî wextî kontrola ser çapemenî û posta jî rakir.

Mezintirîn destkevtiyê wî çaxî biryara rêdana damezrandi¬na pênc partîyên aşkera bû. Navê van partîyan ev in: El-Şe'b (Gel), El-îttîhadu'l-Wetenî (Yekitîya Nîştimanî), El-Wetenu'l-Dimûqratî (Nîştimana Demokrasi), El-Ehrar (En Azadîxwaz), El-îstîqlal (Sencwebûn). Roja 2'yê Nîsanê sala 1946'an bi awakî resmî riya van partîyan hat dan û ji wir şûn de êdî di welat de jîyana sîyasî geş bû. Her yek ji van partîyan xwedî mafê organ û çapemenîyên xwe yên taybetî bûn û hemû jî li gor xwe ji daxwazên gel re xwedî derketin ku di wê demê de ji her tiştî zêdetir daxwaza jiholêrakirina Peymana Sala 1930'an bû. Daxwaza bêrawestan a civakê gel, hukmetê neçar kir ku komîteyek taybetî ji bo lêkolîna ve meselê deyne.

Yekser pişti temambûna Şerê Cîhana yê Duyem, berê her

tiştî ev yeka han derket ku çawan xebata bêrawestandin a gel dikare rêçek nû di sîyaseta hindur û derve ya lraqê de bîne holê. îngilîzên, lraq ji bo tiştek din kiribûn bingeh, ewan dixwestin ku di cîhana piştî şer de, Iraq bi yekcarî bikin bingeha qahîm a belavkirina desthilat û parastina menfe'eta aborîya xwe di seranserê Rojhilata Navîn û Nêzîk de. Ji ber ve çi ew bi

xwe û çi jî kevneperestên hindûr bi guman û tirsê li asoya (ufqa) sîyasî ya nû ya lraqê dinêrîn û bi rikoyî (îsrar) pêwîst didîtin ku bi zûtirîn wext derîyên qefesan bi ser de bigrin. Piştî birek wan zincîrên civînên serokên dewletên Ereban ên bihar û destpêka havîna sala 1946'an, karan han bûn wezîfeyên bi lez li ser milên kevneperestên Iraqe.

Rewşa sîyasî û aborî ya wê demê ya lraqê, berê hemû tiştî peywendîya di navbera hêz û çînên netewî de, heta derecek zade kara kevneperestên lraqe hêşan kir. Carek her welatekî ku ji neteweyek zêdetir neteweyan pêkhatibe, pêwîst e welat¬ parêzan dilsoz hewl bidin ku yekîtiya netewî bikin bingeha hemû guherînên sîyasî yên kûr. Lê dema ku Şerê Cîhana yê Duyem temam bû bi sebebê sîyaseta dûrbîn a îngilîzên, hîn yekîtiyek wisa di zemîna lraqê de di holê de nebû. Bi ser van tevan de, hemû hazên welatparêz ên we demê bi kûrî giringîya yekîtiyek bi vî awayî tênegihîştibûn. Wek belge em vê yeka han tenê bêjin bes e; herçiqas karbidestên lraqê yên wê demê bi awakî zanistî gelê Kurd ji mafên sîyasî yên bi heq bêpar kiribûn, lê çi heye ku yek ji wan partîyan ku me navê wan got, ne di program û ne di karan xwe yên rojane de qîmetek wisa nedidan mesela Kurd, bi rastî jî nedikarîn çarçova pêwîstîya vê meselê dîyar bikin. Partîya Azadîxwazan (El-Ehrar) ku welatparêzekî naskirî yê liberal ê wê deme serokê wê bû, bi carek gelê Kurd avêtibû piştguhê xwe. Ji vê jî xirabtir eva han bû ku Partîya Sencwebûn (El-îstîqlal) gelê Kurd di pêşîya cîbicî-kirina yekîtiya Ereban de*) kiribû "asteng"ek.

Ev cure da-xwaz û nêrînên kurtbîn, karek wisa kirin ku yek ji wan partîyan aşkera yên piştî şer, nekarîn di nav Kurdan de ji

(3) Binere: Mihemmed Mehdî Kubbe, Muzekkeratî Fi Semîmî'l-Ehdas (1918-1958), Beyrut, 1965, rûpel: 199.

175

bo xwe bingehek damezrînin, vê yeka han jî li ser giranî û îmkanên sîyasî-yan tesîrek zade kir.

Di milê din de peywendîya navbera hêz û çînên netewî ji vê baştir nebû. Bêparkirina beşek ji wan çînan ji mafên sîyasî, li gor burjuvazîya netewî kirinek bi heq û di cî de bû, loma di vî warî de yek gotin ji deva wan derneket. Ev yeka han li gel çend sebebên din tesîrek wisa kirin ku karbidest bikaribin ge¬lek bi zû dest deynin li ser destkevtiyên destpekî yên gel. Ji bo ku qet nebe xwe ji wezîrên welatparêz xelas bikin, roja 30'yê Gulana sala 1946'an, Tewfîq Siwêdî naçar kirin da ku ji huku¬meta dev berde. Du roj şûn de damezrandina kabîna nû sipartin Erşed 'Umerî yê ku yek ji kesên sîyasî yên nehizkirî bû û dijminekî naskirî yê hazên demokrasîyê bû. Damezrandina wezareta nû destpêka êrîşên mezin a kevneperestên bû li ser gel. He¬mû li ser hev çar hefte ser re derbaz nebû, polîsan mitîngeke (xwenîşandaneke) Bexdade gulebaran kirin*), pênc kes hatin kuştin û gelek kes jî birîndar bûn. Du heftê piştî vê jî hedîsa bixwînî ya Gawirbaxî qewimî û ev jî bû sebebê kuştin û birîndarkirina gelek karkerên neftê ya Kerkukê.

Ev lexistinên han karan qestî û plankirî bûn. Diviya ji bo zîldanên van guherînên çi kesê ku sera xwe hildana zindî bihata çalkirin û Iraq ji cara din tundtir bi çencên daxwazên Lon¬dra ve bihata girêdan û bibûya bingeha serekî ya êrîşên ser hemû tevgerên rizgarîxwaz ên netewî yên gelên Rojhilata Navîn û Nêzik. Cîbicî kirina van mebestan û li ser vê de jî lêxistina

hezên demokrasîxwaz pêwestê peymanek din bû ji bo tijîkirina wan valatî û kêmasîyan ku di Peymana Sala 1930'an de derketin, bi taybetî jî pişti destpêkirina serîhilda¬ na Gulana 1941'an. Cîbicîkirina vî erkî, wek jê hêvî dihat ki¬ rin, ket ser milê Nûrî Se'îd ê şareza ku roja 21 '4 Teşrîna Duyem a sala 1946'an damezrandina wezaretek nû pê hat sipartin. Nûrî Se'îd jî ku zanayên wek wî di Rojhilata Navîn de kêm hebû, xwest hemû rewş û zemînê pêwist ji bo peymana nû (4) Welatparêzên paytextê, roja 28'e Hezîranê sala 1946'an ve xwenîşandana han rêxistin.

176

amade bike lê morkirina wê bixe ser milê sîyasîyek din. Ji ber ku ew baş tê gihîştibû ku îmzakirina peymana sala 1930'yan heta çi derecê wan kesên ku vê peymana îmzakiribûn ber çava xelkê xistibû. Ji derveyê vê, wergirtina lraqê ji bo endametîya Komela Gelan li ber bû, lê di ev peymana han a nû ya ku îngilîz û kevneperestên dixwestin de ji bili qeyd û zincîrê pê ve tiştek din tûne bû. Eynî wextî Nûrî Se'îd baş bi vê yeka han jî gihîştibû ku ferqîtîya raya giştî ya nîvê salan 40'an li gel raya giştî ya destpêka salan 30'yan gelek e û qet dûr nîne ku di netica de rîsên wî xav bibin, bibin hirî. Ji ber van sebebên, her ewqas çend gavên din dijî deskevtinên demokratik en gel avet û dev ji kar berda û wisa kir ku damezrandina wezareta nû dan Salih Cebr.

Di Adara sala 1947an de Salih Cebr wezareta nû damezrand û her di destpêka de hemû îmkanên xwe seferber kirin da ku rojek zûtir ew peymana ku Londra dbcwest bê morkirin. Ji roja 22'yê Teşrîna Duyem a sala 1947*an şûn de, di destpêka de

li konsolosxana Britanya ya Bexdadê, û dawîyê jî li Koşka Şahane "nûnerên" Iraq û yên Brîtanyayê çend car bi nihênî civîyan. Mebesta van civînên ku heta roja 4'ê Kanuna Yekem dom kirin, dîyarkirina naverok û çarçova peymana nû û awayê morkirina wê bû. Roja 4'ê Kanuna Duyem a sala nû, yanî pişti mehek, li Bexdadê, navê endamên wê heyeta ku "ji bo îmzakirina peymananek nû ya di cîyê Peymana Sala 1930'yan de" dê biçûna Londrayê, hat belavkirin. Heyet di bin serokatîya Salih Cebr de, bi endametîya Nûrî Se'îd, Wezîrê Derve Fazil Cemal, Wezîrê Bergêrî (Difa'i) Şakir Wadî û çend kesên din pêk hat. Bi lez ev heyeta han ber bi Londra ve ket rê û roja 15'yê Kanuna Duyem a sala 1948'an li Korfeza (Bendera) Portsmouth ku dikeve Başûrê Britanya, li gel nûnerên Londra ew peymana ku terh kiribûn mor kirin û bi navê Peymana Portsmouth ket nav rûpelên dîroka hevdemî ya Iraqê.

Peymana Portsmouth bi nisbet Peymana Sala 1930'yan, paş de gavavêtinek bû, ji ber ku wan Iraq tundtir bi Britanya ve girêdan. Li gor peymana sala 1930'yan, tenê di wextê şer de mafê îngilîzên hebû ku eskerên xwe bînin nav axa Iraqê lê li

gor Peymana Portsmouth îngilîzên vê mafê han ji bo di wextê "peydabûna tirsa şer de jî" sitendin, yanî her çi dema ku Londra bixwesta bi her bahaneyek heqê wê hebû ku bi esker bikeve nav axa Iraqê. Li gor benda yekem a Portsmouth, seranserê axa Iraqê ji bo tam 20 salan bû bingeha Britanya. Bendên din ên Peymana Portsmouth miftên (kilîden) gelek zade yên milên jîyana sîyasî, aborî û kar û baran eskerî dabûn destê

îngilîzên*).
Gave îmzakirina Peymana Portsmouth hemû lraqê bi carek hejand. Bi hezaran xwenîşander rijîyan ser kuçeyên bajarên mezin û nerizabûnên gel gelek bi zû gihîştin dereca sirîhildanek mezin û rêk û pêk ku pêşengîya serokatîya wê di destê ha¬zên netewî ên nihênî û aşkera de bû.
Gelê Kurd gelek bi germî tekile nav vê serîhildana bû. Welatparêzên Kurd ên Bexdadê her di destpêka de mil bi milê xelkên paytext, rijîyan ser kuçeyên bajêr. Li Bexdadê, Partîya Demokrat a Kurdistan, Partîya Komûnist û Partîya Gel, komîtekê sê qolî ya taybetî damezrandin ku wezîfa serekî ya wê, rêxistina xebata gel û dîyarkirina sloganên girîng ên xebata ve qonaxê bû. Evên jêrîn ji wan sloganên wê komîtê ne: "îptalkirina Peymana Portsmouth", "Xistina Hukumeta Sa¬lih Cebr", "Helbijartina azadane nûneren gel", "Dayîna mafin demokratik" û "Nehiştina buhatîye".
Ji derveyê van sloganên di wextê serîhildana bi xwe de çend sloganên din hatine avêtin ku beşek ji wan peywendîya xwe bi mafê neteyî yê Kurdan ve heye. Longrigg, bi awayê jehrrîjandinê, ve serûbinîya şoreşgerî nincandîye û wiha dibêje:
"Ezv peymana bi hiz a sala 1948'an di navbera netemeperestan û Kûrdin komûnist en ser Rusya hat îmza kirin... tekilhevîyen be ser û bin ser kuçe û mektebin bajiri Silemanîyi de anî"<6>.
(5) Derbare metna bendên Peymana Portsmouth binêre: Ebdulrezaq El-Hesenî, Tarîxu'l Wezaretu'l lraqîyye, el-cuz'u'1-sabî, Şeyda, 1968, rûpel: 233-239.
(6) S.H.Longrigg, Iraq 1900 to 1950, London, 1953, P.353.

178
Hazên netewî ên din jî destgirêdayî nesekinîn. Hîn heyeta
Salih Cebr neçûbû Londrayê, Partîya Wetenî-Dîmuqratî, îstîqlal
û Ehrar belavokek sêqolî belav kirin, tê de daxwaza jiholêrakirina
peymana sala 1930'yan kirin û raya xwe gihandin
Hukumeta Salih Cebr ku bi tu awayî mafê wî tûne ku li ser
navê lraqê peymanek nû li gel Britanya îmza bike* \
Dema ku Fazil Cemal ê Wezîrê Derve li Londra hewlê destpêkirina
"muzakereke girîng" a di navbera Britanya û lraqê
de da xûya kirin teqînîyên mezin ên gelerî yên lraqê we rojê
destpê kir. Roja pişti wê ku dike 4'ê Kanuna Duyem a sala
1948'an*°), bajarê Bexdadê bi carek ser û bin bû. Her we rojê jî li
ser fermana serokwezîran, polîs ketin cana xwenîşanderên
paytextê. Rojek şûn de karbidestên Fakulta Hiquqê li ser vê
behanê fakultê girtin ku goya bîr û bawerîya tekilhevîyê di
nav xwendevanên wê de belav e.
Ev bûyerên han ên Bexdadê Wezareta Salih Cebr ji îmza kirina
peymanek nû dûr nexist. Roja 5'ê Kanuna Duyem endamên
heyeta "lraq"ê bi firokek taybetî çûn Londrayê. Vê yeka han
hinek din welatparêzan lraqê şidand. Her wê rojê cardin
xwendevanên Bexdadê rijîyan nav kuçeyên bajêr û sinif û tebeqên
din jî mil dan ber wan. Vê cara jî polîs êrîş anî ser wan û di
netîcê de ji herdu milan jî hejmarek zade kes birîndar bûn. lê
dezgên dewleta di belavokên xwe de ku li ser van bûyeran be¬
lav kirin, behsa birîndarîya 42 polîsan kirin. Zû derket ku
wan dixwestin vê yeka han bikin behana pelçiqandin û tehdayên
tund û tujtir. Ji ber vê, roja Te Kanuna Duyem belavokek
belav kirin ku bi tehdit û çavtirsandinek zade ve digot:

"Hûkûmet, di bi amakî tund biçe ser man kesan ku dixmazin hênini û asayişi tik bidin".
Neticen van kar û biryaran bi tevayî di eksê daxwazên kar¬ bidestên çêbûn. Li ser van biryaran hêminîya Bexdad a pay-
(7) Binere: Sewtu'l Ehrar (ceride), Bexdad, 1 û 2. Kanunî Sanî 1948, Mihemmed Mehdî Kubbe, serokanîyê ku navê we derbaz bû, rûpel: 225-226.
(8) Fazil Cemal ve xebera han roja 3'yê Kanuna Duyem a sala 1948'an belav kirîye.

text deyne cîyek, eynî wextî bajarên din jî têkilê serîhildana gel bûn. Dema ku kar gihîşt vê derecê, goya ji bo lêkolîna daxwaza gel Cemal Baban ê cîgirê Salih Cebr neçar bû li gel hej¬ marek sîyasîyên naskirî civînek taybetî çêke. Her çi hal bû, hûkûmet neçar bû hinek xwe paş de bikişîne. Ev yeka han bû sebeb ku roja 8'ê Kanuna Duyem biryara vekirina Fakulta Hu¬ kuka û berdana girtîyan bi kefalet, bidin.
Lê van biryaran xelkê paş de neda, ji ber ku li ser van hemû têkilhevîyan de hîn hukumeta ji îmza kirina Peymana Port¬ smouth paş de gav neavêtibû. Ji ber vê ji roja 16'yê mehe şûn de cardin li hemû milan xwenîşandan çêbûn. Xwendevanên mektebên navendî û dezgên unîversîta, biryara greva sê rojan dan. Sê roj şûn de sendikan*) karkerên jî daxwaz ji endamên xwe kirin da ku ew jî "di riya cîbicîkirina daxwazên tevgera netewî ya gel de agirê xebata xwe geştir bikin". Eynî wextî hazên burjuwazî yên netewî jî hewl dan ku ji bo firehkirina xebata asê ya van rojên teng ên dîroka welatê xwe, bikevin xebatê di nav civakê xelkê de. Ji bo vê mebesta cardin heryek

ji partîya Wetenî-Dîmukratî, îstîqlal û Ehrar, bi sera xwe be¬
lavokên dirêj belav kirin ku beşê piranî yê belavokên hersêyan
jî ji bo danexûyakirina naveroka Peymana Portsmouth û
aşkerakirina mebestên wê yên nihênî bû*10).
Van bûyerên han bi carek welat ber geşbûnê de bir. Roja 19'yê
Kanuna Duyem, bi deh hezaran xwenîşander bi sloganên xwe
yên netewî ve ketin hewildana çareserîkirina nerizayîyên
gel. Xwenîşanderên Bexdadê vê çare berê xwe dan hola par¬
lamentoya û bi yek dengî gotin: "Mirin ji bo Peymana Port¬
smouth", "Hilweşe wezareta Salih Cebr".
Rojek şûn de, yanî 20'ê Kanuna Duyem, cardin polîsê paytext
deste xwe dirêjî xwenîşanderan kir, bû sebebê şehîdbûna çar
(9) Civat, yanî "neqebe". Oi bo rê baş dana fehmkirine me di şuna
her duyan de jî sendika bikaranî-Elîşêr.)
(10) Ji bo van belavokên binêre: Dr.Fadil Huseyn, Tarîxu'l Hizbu'l
Wetenî' 1-Dîmuqratî, Bexdad, 1963, rûpel: 222, Ebdulrezaq el-
Huseyn, serokanîyê ku navê wê derbaz bû, el-cuz'u'1-sabî, rûpel: 241-
180
kesan û birîndarbûna dehan kesên din. Roja din bi hezaran welatparêz
ji bo beşdarbûna cenazên qurbanên roja borî, rijîyan ser
kuçan û meydana Nexweşxana Mecîdîyê* , carek din bûn hedefê
gulereşandinê û vê cara jî du kes şehîd bûn ku yek ji wan
xwendevanê Fakulta Dermansazîyê bû, gelek ji wan jî birîndar
bûn.
Van kirinên dawîn ên hukumeta wan grubên bêalî jî
dişitandin ku heta wî çaxî ji ber sebebên cihê beşdarî xebata
gel nebubûn. Berpirsîyar û grubek mamostan Fakulta Tibê ge¬
lek bi tundî nerizayîyên xwe dan xuyakirin û li gel nêzîkî 100

doktoran bajarê Bexdadê ve dest ji kar berdan*12\
Dema ku kar gihîşt vê qonaxa nazik, êdî 'Ebdulîlla neçar bû ku yekser bê saha. Roja 21'ê Kanuna Duyem bi grubek mirovên sîyasî yên navdar re civîya ku nûnerên her sê partîyan sîyasî yên aşkera bûn*) Wan bi aşkera daxwaza çûna Salih Cebr û sekinandina hemû cure peymanan jê kirin*1 \
'Ebdulîlla dît ku kara wî ber bi jêr ve diçe, neçar bû ku nûnerên gel çi dixwazin, wisa bike. Di destpêkî de belavokek di radyoya de da belavkirin û tê de soz da ku "tu peymanek a mafi melat û daxmazin netemîyan negre berçav, neyi îmza ki¬rin". Lê eynî wextî Salih Cebr ji Londrayê ve ket êrîş û tehdîdan û di belavokek taybetî de serîhildana gel kir ser milê wan kesên ku navê wan kir "komûnist û nazî"(û) û da xuya kirin ku bi xwe bi awakî zû "ji bo wan kesên ku bi şaşîtî kar tevlîhev kirine", vedigere Bexdade.
(11) Vê nexweşxana han di wexte xwe de Osmanîyan di "Babu'l Mu'ezzem" a Bexdadê de çêkirine û navê Sultan Ebdulmecîd le ki¬rine, heta salen 50'an jî her jê re Xestexana Mecîdî dihat gotin. Heta niha jî beşek ji avayîyên nexweşxana Mecîdî mane, kirine ser "Mendînetu'1-Teb".
(12) Binêre: (Revolution in Iraq), Baghdad, 1958, PP. 13-14.
(13) Karbidestên her bi zû Partîya Gel (Şe'eb) û Yekîtiya Nişti man (Ittîhadu'1 Wetenî) girtin.
(14) Ji bo direjîya van behsan binere: M. Khaddurî, Independent Iraq (1932-1958), London, 1960, P. 268.
181
Ev belavoka han a serekwezîr hinek din xelkê aciz kir. Roja 23'yê Kanuna Duyem, cardin di hemû milan ve civakên gel

rijîyan ser kuçeyên paytext û bajarên mezin ên din û vî carî ku rikoyî bûn ku heta ev sloganên serekî yên xwarê neyên cîbicî kirindev jê bernedin .

1) Çûna Wezareta Salih Cebr
2) Berdana girtîyen sîyasî
3) Helbijartinek azad

Rojên 24 û 25'ê Kanuna Duyem, di bin daxwazên van sloganên de çend xwenîşandanên gelek mezin li Bexdad û bajarên mezin ên din çêbûn. Rojek şûn de Salih Cebr gihîşt Bexdadê. Hatina serekwezîr û karan wî, bûn neft û ketin ser agirê serîhildana gel, ewî bi bawerîyek tam soz da 'Ebdulîlla ku di navbera 24 se'etan de "hamini û asayiş dê bibe wek berê". Cemal Baban bi wê yekê gunehkar kir ku goya dema ku ew li derveyî welat bûye, wî " bi nermî li gel tevlîhevkeran beşdarî kirîye". Van tohmetên han wisa kir ku Cemal Baban yekser dev ji wezareta berde. Wezîrê Kar û Bara Hindûr jî ji bo ku "şaşîtî"ya Cemal Baban tekrar neke, wê roja ku Salih Cebr gihîşt Bexdayê fer¬ man da hemû polîsên lraqê da ku bi tundî li xwenîşandanek nû bixin. Roja din, yanî 27'ê Kanuna Duyem bi hemû milan de polîs ketin cana welatparêzan. Wê rojê li Bexdadê 20 kes kuştin û gelek ji van zêdetir jî birîndar kirin. Xwenîşanderên Bexdadê wê rojê çapxana "Times lraq" a ku di destê Inilîzan de û merkeza rewşenbîrî ya Britanya şewitandin. Li Kerkukê jî welatparêzan êrîş birin ser konsolosxana Britanya* '. Ji tirsa xwenîşanderên Kerkukê dezgên kompanya petrolê bi polîs hatin parastin. Xelkê bajarê Silêmanîyê ji yekemin roja serîhildana Kanûnê ve bi carek rabibû. Li vir jî xwenîşanderan erîş birin ser merkeza rewşenbîrî ya Britanya û şewitandin.

Van bûyeren han bi carek tirsê xist nav rêzên piranîya kar¬
bidestên welat. Bîhna şoreşa di hemû milî de bilind dibû.
Eyne rojê yanî 27'ê Kanuna Duyem, Wezîrê Malîyê, Wezîrê
Kar û Baran Civakî, Serokê "Encumenê Nûnerên" û 20 kesên
(15) S.H.Longrigg, Op. Cit., P.347.
182
din dev ji kar berdan. Lê Nûrî Se'îd, Salih Cebr û yên nêzî
wan dixwestin bi çi awayî dibe bira bibe, serîhildana gel bi¬
tefînin. Li gel vê jî her eynê rojê Ebdulîlla neçar ma daxwaz ji
serekwezaretan bike ku dest ji kar berdin û se'et heştê şevê, vê
xebera han di riya radyoya re da belavkirin.
Ev yeka han di rojên serîhildana Kanûnê de yekem serkevti¬
na mezin a gel bû. Ev serkevtina han a hêja ne tene di dîroka
hevdemî ya lraqê de, eynî wextî di dîroka hevdemî ya seransere
Rojhilata Navîn û Nêzîk de jî bûyerek hêja bû. Civakên
gel di hemû alîyan ve, gelek bi germî alîkarîya ketina weza¬
reta Salih Cebr kirin.
Destkevtinên mezin ên van rojan, xelk û partîyan sîyasî sar
nekirin, wan dev jê berdana lraqê ji "Peymana Portsmouth"
dixwestin û ji wê ditirsîyan ku dûncistina Salih Cebr tenê
paşdekêşanek tektikî be. Ev yeka han, bû sebeb ku roja 28'ê
Kanuna Duyem karîn karek wisa bikin ku nehêlin damezran¬
dina kabîna nû ji Erşed 'Umerî re bê dan ku wek Salih Cebr
sîyasîyek bê zirav bû. Ji ber vê Ebdulîlla û kesên rawêjker
neçar bûn li ser yeki wisa bisekinin ku xelk di wan rojan de pê
qaîl bin. Roja din damezirandina kabîna nû sipartin Mihem¬
med Sedr ku mirovekî dînî yê naskirî û yek ji wan serokê Şore¬
şa Bîstan bû. Ev yeka han bi sera xwe ji bo grubek karbidest

problemek din bû. Bi taybetî ger em vê yeka han jî bigrin ber çav ku du nûnerên burjuwazîya netewî di wezareta Mihemmed Sedr de cî girtin, ê yekem Mihemmed Reza Şebyî û yê duyem jî Mihemmed Mehdî Kubbeyê serokê Partîya îstîqlal bû. Lê li alîyê din nûnerên grubên kevneperest ên wek Cemil Medfe'î û Erşed 'Umerî bûn endamên kabîna nû ku eynî wextî partîya Wetenî-Dîmuqrati jê dûncistin. Herçî Partîya Ehrar bû bi xwe nexwest beşdar be.

Gelek li ser de derbaz nebû, zeman îspat kir ku ev problema han a kevneperestên lraqê gavek deqîq û dûrbîn bû, lê ji bo gihîştina netica hîn pêwistî bi çend gavên din hebû. Serekwezîre nû Mihemmed Sedr, di yekem belavoka xwe de, sozê cîbicîkirina "daxwazên gelê lraq ê serbilind" da. Roja l'ê Sibatê jî biryara damezrandina komîtek taybetî ya ji bo tesbîtkirina "gunehkarên xwînrijîna Kanuna Duyem" dendst. Vê ca-

183

rê du roj şûn de qerarê biryara betalkirina "Peymana Ports¬mouth" da.

Van biryaran han hazên netewî ji xebatê dûr nexistin, wan dixwest ku hemû slogan û daxwazên gel bên birikirin. Hêjayî gotina ye ku xebata gelê Kurdistanê jî di wan rojan de eynî bi vî awayî bi firehî û rêxistinî gihîşt Bexdadê. Xelkê bajarê Si¬lêmanîyê, wek mîsal; di namek taybetî de van daxwazên xwarê kirin ber destê Wezareta Salih Cebr ku di naveroka xwe ya gelemperî de ji slogan û daxwazên serekî yên navçe û herêmên din pir cihê nebû:

1) Dayîna heqên demokrasi yên gel

2) Rêdan ji bo jîyana partîyan serbixwe

3) Rêdan ji bo damezrandina sendikan karkerên
4) Azadkirina hemû girtiyên sîyasî yên Iraqê
5) Ji holêrakirina Peymana sala 1930'yan.
Nêrînên nama bi vî awayî dawî lê hatibûn: "Xelkên bajarê me, dest ji xebata xwe bernadin heta ku ev dawxazên han neyên birikirin"* \ Ji bo bicîkirina eynê mebesta, Sibat û Ni¬sana sala 1948'an, çed heyetên taybetî ji Kurdistanê hatin Bexdadê. Roja 13'yê Sibatê, nûnerên Hewlêr û Köye bi hev re rijîyan ser kuçeyên Bexdadê û pişti zîyareta gora şehîdên 27ê Kanûnê li gel xelkên paytextê beşdarî civîna cenazê welatparêzê Kurd Hiseyn 'Elî bûn ku berê wê di xwenîşandanek Bexdade de hatibû birîndarkirin. Kovara Gelawêj di vî warî de wiha nivîsandîye:
"Roja 13.2.1948 'an, posta Köye û Hemler gihîştin cî, ve yeki ji re bijin, miranî nişan dan, di kuçeyên de em çûn ser gora şihîdan. Qevdek gul ji man re dîyarî birin, ji man re gotin misa nezanin ku hun çûnel Hun neçûne, di aunciken dilin me de cîyi me heye. Bi vi jî nesekinîn, bi cenaze lami gel (Kurd) Hiseyn 'Eli ye nûgihîştî re çûn bajare pîroz Necef, ev bajare han ku nevîye (torini) Pixember li mir mevan e û xelkin mî jî ehle 'Um û 'irfan in"(17) .
(16) Binere: Nûrî Ebdulrezaq Huseyn, Teyyaratû Sîyasîyye Fî'l-Hereketî'l Wetenîyye'l-Iraqîyye, Qahîre, bila. rûpel: 65.
(17) Binêre: Gelawêj, Adar 1948, rûpel: 14.
184
Roja 26'ê Sibatê jî heyetek ku ji 500 kesan pêkhatîye ji Zaxo, Ranye û Silêmanîyê, hatin Bexdadê û li gel welatperwerên paytext re xwenîşandanek mezin çêkir û çûn ser gora şehîdan,

li wir çend gotaran bi erebî û kurdî xwendin û çend caran jî bi germî behsa wê kirin ku divê xebata mûşterek a Ereb û Kurdan bibe kevirê hîmê tevgera rizgarîxwazîya niştimanî, da ku gel bikaribe bi ser dijmin de serbikeve. Cardin kovara Gelawêj ve roja han a dîrokî di vê çarçova han de girtîye dest:
"Roja 26.2.1948'an lamin geli Silemanîyi gihîştin ev18'. Em teni bi sere xme 300 kes bûn. Bi lamin Ranye û Zaxo re bûn yek ku hejmara man bi hev re gihîşt dore 500 Kûrdin camir in dilsozin dilbirîn, em ji bo doza birayin xme yin hemfikir diçin.
Piştî ku li Deşti Melik Feysel rez girtin, beri xme dan Gorista¬ na^9' Babu'l Mu'ezzem, se'et didu û nîve piştî nîvro di Şari'û Reşîd de riketin...Di pişi de flamin \raqi, piştî man hinek mirovin maqûl û rîspî bi cil-bergin kurdî ve, pist van de rizen ji çar-çar pikhatî, di pist flamin xme de grubin Silemanîyi, Ranye û Zaxo. Pist man de keçin Kurdan qevdek gul di destin man de, pist van de xorten bi cil-bergin kurdî û pankartin xme, pist van de jî cotek zarokin biçûk bi şal û şapikin xme û cardin keçen bi qevdin gulan û rihanan ve, di damîyi de jî Kûrden zarok... serî hat ser xortan û pankartin man, ser van pankartan hemû cure tişt hatibûn nivîsandin, mek; pirsa şehîdan, navin heyetin Kurdan, jîyana Kurd û Ereban, biratîya Kurd û Ere¬ ban, daxmaza asayişi di melat de. Ev meşa han bi amakî ge¬ lek baş hatibû rik û pik kirin. Di navbera bîst gavan de du Kurd, yek li mili raste û ye din li mili çepi bi cil-bergin kurdî, bi rext û dabancin birno ve dimeşîyan. Evana hemû per¬ den şîn û xemîyi bi ser de kişan, deste hemûyan li ser hev, bi deng û his ketin re. Alema Bexdade her ji Saha Melik Feysel û heta Goristana Babu'l Mue'ezzem bi jin û mir vî milî û mî milî

Şari'û Reşîd girtin û li mi menzereyi û meşa man denirîyan.
(18) Di cîyên gelek pêwîst de nebe li rênivîsê destkarîyek nehatîye kirin. (Mebest orijinale kiteba ya bi Lehça Soranî ye-Elîşêr)
(19) Di metna gotare de; rûwew gorrî...(ber bi gore-Elîşer)
185
Se'et çaran gihîştin goristani û ketin hindûr..."^2 '.
Gelawêj dema ku hatîye ser behsa axaftina Heme Ehmedî Taha ku li ser gora şehîdan xwendîye, bi van gotinên xwe yên gelek ma'nedar piştgirîya axaftina wî Kurdî kirîye:
Ey "şehidin riya azadîyi! menzereyin van kur û keçin han ku hun li ser gora xme dibînin paşvemayin hovîtîya roja reş a 6'e îloni ne ku ji bo azadîyi hatin meydani û destin pis yen bîyanîyan bi desten me yin dirij i merdane giridan û bi me re man nehizker dan xuyakirin! Em armancin ku hun ji bo man daketin meydani, em jî ji bo man ketin zindani! Niha em bi hev gihîştin ku dile me li hemberi hev pak e, armanca me armancek pîroz e û dili me dilek paqij e!!"^ '.
Roja 5'ê Gulana 1948'an dema ku heyeta Xaniqîn gihîşt Bexdadê ev tev bi hev re carek din meşîyan* '.
Xebata bêwestan a gel di seranserê welat de, Wezareta Mi¬hemmed Sedr neçar kir ku beşek din ji daxwazên welatparê¬zan cîbicî bike. Piştî dudilîyek zade, roja 22'yê Sibatê daxwaz ji encumenê nûnerên kir û biryara helbijartina nû dencistin, hejmarek zade ji girtîyên sîyasî berdan û rê dan rojname û ko¬varên girti ku carek din bên weşandin. Bi qasek şûn de qerarê paşdekişandina grubek eskerên Britanya da û van kare civakên xelkê "serkevtinek netewî" ya mezin da xuyakirin*23).
Gelê Kurd jî di netica serkevtina serîhildana Kanuna Du¬

yem de gihîşt çend mafên xwe yên serekî. Di dîroka Iraqê de yekemin car îzna weşandina kovarek sîyasî ya bi zimanê Kurdî hat dan*24). 21'ê Adara sala 1948'an, cara yekem Kur¬ dan bi vî awayî fireh û aşkera li Bexda û bajarên Kurdistanê Newrozê pîroz kirin.

(20) Gelawêj, eynî hejmar, rûpel: 14-16.

(21) Eynî serokanî, rûpel: 17.

(22) Eynî serokanî, rûpel: 18-22.

(23) Ev gotin a Longrigg e, binêre: S.H.Longrigg. Op. Cit., P .347.

(24) Mebest kovara Nezar e, ku Xwedê jê razî be Mamoste 'Elaeddîn Seccadî sernivîskarê we bû.

186

Lê gelek mixabin bihara nû ya gelê Iraqê gelek temen ('umr) kurt bû. Kevneperestên Iraqê karîn bi zû desên xwe bidin hev û bikevin êrîşê. Hîn meha Adara xelas nebû ku Wezareta Mi¬ hemmed Sedr li gor destura Wezareta Salih Cebr, rê neda ku Partîya Gel (Şe'eb) dest bi xebatê bike. Ev inhirafa Wezareta Sedr di wextê helbijartina nû de xwe zêdetir nişan da. Li ge¬ lek bajar û navçan dezgên dewleta bi awakî aşkera desten xwe kirin nav kara helbijartina û li çend cîyan welatparêz û polîs li ser vê yekê li hev ketin. Eynî wextî li çend cîyan karbide¬ stên li karkerên xwe xistin. Polîs greva karkerên şî-mendifera Hewlêrê tefand. Ji vê jî xirabtir li karkerên Hedîse hat kirin, bi taybetî ji ber ku bûn sebebê zerargîhandina kompanya neftê Iraqê. Hinek serokanî vî zerarî han çend milyon dînar dinivîsin. Pişti vê, di rîya çend mafek seretayî de mecbur man ku grev bikin (25).

Kevneperest bi vê tenê qayîl nebûn, ewan dixwestin Iraq

vegerînin rojên berê, cardin hazên netewî bêdeng bikin, kar û baran welat bidin destê Nûrî Se'îd û der û dorên wî. Ji bo bicîkirina vê mebesta û jarkirina wezareta Sedr, hin endamên wezareta xwe kişandin. Ji vê jî zêdetir, kevneperestên wî çaxî yên lraqê feyde ji bûyerên Filistinê wergirtin. Bi vê behanê ji meha Gulana şûn de bi sedan welatparêz kirin zindana. Hej¬marek zade ji xwendevanên Silêmanîyê di dema îmtiha-nan de berhev kirin*) Pişti ve Mizahim Paçeçî ku dostekî nê¬zîkî Nûrî Se'îd bû, roja 26'ê Tîrmeha sala 1948'an wezareta nû damezrand û piştî vê jî êrîşa kevneperestên a li ser welatpa¬rêzan hinek din tûj û tûndûr bû. Gelek ser de derbaz nebû, nîr û zinrira cara berê kirin stûyê civakên xelkê.

Gelek sebebên alîkarîya kevneperestên kirin da ku bikarin bi vî awayî zû li destkevtiyên xelke yên serekî bixin. Berê hemû tiştek divê em vê rastiya han bixin ber çav ku beşek ji hazên netewî, armanc û problemên mezin ên di navbera kevne-

(25) Wek mîsal binêre: kovara Rojhilata îro, bi zimanê Rusî, Mos¬kova, hejmar: 5, 1957, rûpel: 14.

(26) Dîtinek bi efsere zabite) teqawît Mistefa Ebdullah re, roja 15'yê Sibata 1985.

perestan de bi awakî dûrbîn qîmet pê nedan û heta di dema ketinê de, heta derecek bi wan re zade germ û nerm bûn. Wisa dixuyê ku "marên mama Ömer" di bîra wan de nebû. Serokê Partîya "îstîqlal"ê Mihemmed Mehdî Kubbe qayîl nebû di Wezareta Mihemmed Sedr de beşdar be, ji ber ku tenê bi Wezareta Temwînê qayîl bû ku zade rolek wê tûne bû. Çi heye ku berambere viya di germîya serkevtina gel de wezaretên herî

girîng ên wek Kar û Baran Hindûr, Derve û Bergêrî dan destê hejmarek sîyasîyên kevneperest ku ji wan rojan êdî kerixî bûn. Eynî wextî beşek ji hazên netewî yên burjuwazî di karan xwe yên rojane de bi curek wisa pê radibûn ku dijîfiyên wan bi sinif û grubên netewî yên din re gihîştibûn dereca teqînê* .
Bêguman li gel tev kil û kêmasîyan jî, serîhildana bi qehremanî ya Kanûnê, bûyer û netîceên wê, rûpelek şewqdar a dîro¬ ka hevdem a lraqê û Rojhilata Navîn û Nêzîk in. Wek dîroknivîsê Misrî Mihemmed 'Ewde nivîsandîye; ev serîhildana han mezintirîn derbe bû ji bo "sîyaseta derve ya Ernist Bevin *2°) di seranserî Rojhilata Ereban de"*29). Ji ber ku bi rastî bûye sebebe hilweşandina planek mezin ku Londra dbcwest bi wê rîyê re welatên navçê ji carên din hîn xurttir bi xwe ve girê bide. Welatparezên welatên Ereban bi awakî zû bi vê rastiya han gihîştin, ji ber vê bi germî pişgirîya xebata qehremane ya gelê lraqe kirin. Rojên sirîhildanê kuçeyên Qahîrê, Şam û Beyrudê xwenîşandanên mezin dîtin* \
Serîhildana Kanûnê bû destpêka guherînek mezin û pirr netice di cur û awayê bîr û bawerîya sîyasî yên civakê xelkê lraqe ya Kurd û Ereb bi hev re. Ev yeka han jî berê hemû tiş-

(27) Wek mîsal binere: Sewtu'l Ehalî (cerîde), Bexdad, 19 Ilon 1948, Mihemmed Mehdî Kubbe, serokanîyê ku navê we derbaz bû, rûpel: 248-249.
(28) Wextê îmzakirina Peymana Portsmouth, Ernist Bevin, Wezîrê Derve yê Britanya Mezin bû.
(29) Mihemmed 'Ewde, Sewretu'l Iraqîyye, Cjahîre, bila, rûpel: 62.
(30) Binêre: Xalid Bekdaş, Întîfadetu'l-Şe'ebu'l-Iraqî Li senetî 1948 We Eserûha Fi Tetewwurî'l-Qezîyye'l-'Erebîyye, Metbe'etu'l

Musenna, 1948, rûpel: 11.
188
tek, xwe bi awayê xebata wan a dijî dewletên emperyalist de da xûyakirin, bi vî awayî ev xebata han ket nav çarçoveke giştî ya yekgirtî. Tu wextî bi qasî dema Kanuna Duyem a sala 1948'an bi vî awayî bi sedan hezar kes di seranserê lraqê de û eynî wextî ji bo yek armanca serî hilnedabûn. Li gor hinek se¬rokanîyên, hejmara beşdarên vê serîhildana ji 300 000 kesî zêdetir bûn *31).
Yek ji netîceyên herî girîng û mezin ên serîhildana Kanûnê, ji vê pêkhatîye ku di destpêka de bi kirinên xwe ve, qîmeta xebata mûşterek a rêxistinî ya Ereb û Kurdan nîşan daye . Ev rastiyan han bûne kevirên hîmê serkevtin û destkevtîyên serîhildana bi xwe. Gelek hêzen pêşkevtixwaz ên Ereban, ve yeka han qebul kirine* '. Yek ji wan netîcên girîng ên vê bû¬yerê nû eva han e ku daxwazên gelê Kurd tenê di çarçova Kur¬distanê de neman, ji ber ku heta dereceyek tesîrê li navçan din jî kirin. Di rojên serîhildana bi xwe de, ji her çar alîyên lraqê sloganên berdana girtiyên sîyasî yên Kurd hatin bilindkirin, heta vê yeka han dîqqeta dîroknivîsên derve jî kaşa ye* \ Di Kurdistanê bi xwe de jî yekemin car di rojên serîhildana Kanûnê de hestê biratiya navneteweyî xwe xist pêş*). Kurd, Tirkmen û Asurî, li Kerkûk, Xaniqînê û ciyên din xebatê ji bo yek armanca di mewzîyek de civandin.
Kêm tişt bi dereca vê bûyerê nû ya jîyana sîyasî ya gele Iraqê tirşe kir nav dilê emperyalîstan. Gelek ser serîhildana Kanûnê de derbaz nebû, "Intelligence service" ya Britanya* '
(31) Binêre: (Sovermenay Iraq), Moscow, 1966, P. 158.

(32) Wek mîsal binêre: El'exbar (ceride), Beyrut, 9 Sibat 1964.
(33) Binêre: S.H.Longrigg, Op., P .346.
(34) Li Gawirbaxe ev cur yekîtiya han tene di nav karkerên kompanya petrole lraqê de, di rojên greven havîna sala 1946'an de hat domandin.
(35) "Intelligence service" dezga casusî ya Britanya ye ku destpêka damezrandina we diçe digihîje dor û bere dawîyê sedsala 15'an. Ji bo cîbicîkirina armancên xwe, dest daveje hemû hemû riyek wek plan zivirandinen kirrîn, xapandin, çandina tovên dijîtîya, kuştin û birîn.
189
di yek belgeyek xwe ya nihenî de daxwaz ji mirovên xwe kir ku piranîya beşê xebata xwe ya lraqê ji bo geşkirina agirê dijî¬ tîya netewî ya di navbera Ereb û Kurdan texsîs bikin* '. Eynî bi vî awayî bi wasita kesên bi kirîgirtîyên kompanya petrolê, ji bo cîbicîkirina van armancên xwe bi aktîfî dest bi xebatê ki¬ rin.
Yek ji nîşanên cihê û destkevtinek aşkera ya civakî ya serî¬ hildana Kanûnê, ev yeka han bû; ku jinên bajêran, çi Kurd û çi Ereb, bi awakî fireh û rêk û pêk têkilê jîyana sîyasî bûn û mil bi milê mêran de ji bo xistina Peymana Portsmouth ketin mey¬ dana xebatê. Yek ji beşdarên vê serîhildana bi taybetî behsa cîyê jinên Kurd di xwenîşandanen Bexdadê de kirîye*3 '.
Serîhidana Kanûnê nîşan da ku êdî çawan bajêr bûn merkezên serekî yên tevgera sîyasî û xebata rizgarîxwazî û çawan êdî gundên di pê xwe de dikişinin* '.
Ev yeka han nişana cîgirtina xebata rizgarîxwazî, jinavçûna sinif û grubên derebegî û durustbûna yekbazarî ye. Di rojên serîhildana Kanûnê de nişana berzbûn ên rola pêşengîya baja¬

rên, di Kurdistanê de jî gelek bi ronî xwe nîşan da, bi taybetî di wê tevgera de ku di nav gundîyên 'Erbete de*) di Îlona sala 1948'an de teqîya. Gelê Kurdistanê di tevgera 'Erbete de cara yekemin bi awakî rêxistinî slogana xebata li dijî bin¬ destiya derebegan hilda. Rakêşandina gund ji alîyê bajarên ve, di hêla sîyasî de di bûyerê 'Erbete de bi vî awayî têt dîtin ku gundîyên navçê dema tevgera xwe de ji bilî daxwazên aborî yên taybetî, çend sloganên sîyasî jî hildane, wek ji holêraki¬ rina Peymana sala 1930'yan, girênedana qet tu cur peymanek

(36) Binêre: El-Xed, mucelle,? Şubat 1964, rûpel: 12-13.

(37) Binêre: Nurî Ebdulrezaq Huseyn, serokanîyê ku navê we der¬ baz bû, rûpel: 6Z

(38) Yanî "el-medînû tecirrû raeha'l-qerye" (bajêr gundên pê xwe de dikişin-Elîşêr.), eva han jî yek ji wan nuqten girîng ên kemilîn û berpêşdeçûna
xebata gel e.

(39) 'Erbet dikeve Deşta Şarezore, yanî di navbera Helebçe û Silê¬ manîyê de.

190

nû bi welatên emperyalist re, kişandina eskerên dawî yên bîya-nîyan ji ser axa welat, berdana girtîyên sîyasî û çend daxwazek bi vî awayî. Nêzîkî 500 cotkaran navça 'Erbete, van daxwazên han wek telgrafek ji karbidestên Bexdadê û rojnamên paytext re şandin* '.

Tevgera gundîyên 'Erbete du rastiyan din jî nîşan dan; yekem kûrbûna tesîreke jîndar di navbera bûyerên bajêr û gundên de; ya duyem jî, cîgirtina xebata mûşterek a Ereb û Kurdan bi awakî hêşan û zû. Roja 17ya îlona 1948'an hejmarek zade ji

welatparêzan Bexdadê ji bo piştgirîya cotkaran 'Erbete, xwenîşandanek rêxistin û her sloganên wan avêtin*41). Vê yeka
han bi carek kevneperestên Iraqê teqand û bê cî grubek ji heza burjuwazî ya netewî jî tirsand. Polîsan eynê demê berê xwe dan cana welatparêzan Bexdadê û gundîyên 'Erbete. Tenê li Bexdadê 88 kes birîndar kirin û 250 kes jî girtin*42).
Rabûna cotkaran 'Erbete û piştgirîya wan ji alîyê welatpa¬ rêzan paytext ve, bûyerên serîhildana Kanûnê bi xwe û êrîşa kevneperestên, di dawîyê bihara sala 1948'an de heta derecek girîngîya cepheyek netewî ya yekgirtî di gelek milên
sîyasî ve ferz kiribû. Ji ber ku yek ji wan sebebên ku wezîfa ser milê kevneperestên Iraqê hêşan kir, ev yeka han bû ku hîn hemû hêzen netewî bi girîngîya cepheyek netewî tênegihîştibûn. Ji ber vê, qet ecêb nîne ku di rojên serîhildana
Kanûnê de herçiqas hazên netewî yên peşkevtîxwaz, bi yekawayî slogan hilgirtibûn jî carên wisa hebûn ku mil bi milên
hev nediçûn meydana xebatê. Xwedê qebûl neke, dijmin jî ji alîyê xwe de texsîr nekir, çend ji destê wî dihat ewqas agirê dijîtîya geş dikir. Dema ku ket cana yên jê nehezker, bê ferqîtî hemû di yek girtigehê de berhev kirin. Ev yeka han bû dersek mezin ji bo welatparêzan Iraqê û rollîstina çekirina riya da¬ mezrandina cepha niştimanî ya yekgirti ji bo rojên muşteqbel.
(40) Binere: Sewtu'l Ehalî, 19 îlon 1948.
(41) Eynî serokanî
(42) Binere: Ebdulrezaq Huseyn, serokanîyê ku navê wê derbaz bû, cilda duyem, rûpel: 14.
191
Emperyalîstan û kevneperestên hindûr jî kêm dersên ji kirinên

serîhildana Kanuna Duyem a sala 1948'an wernegirtin.
Serkevtina xelkê û betalkirina "Peymana Portsmouth" berê her tiştî vê rastiya han dencist ku di lraqê de meşandina rêbaza sîyaseta kolonyalîzma klasik êdi wek çekê berê nîne û mumkun e ji wan re zerarê wê ji qezencên wê zêdetir be. Ji ber vê, bi vî awayî êdî dest avêtin hîle û planên sîyaseta "kolon¬ yalîzma nû"* \ Carek din bi awakî sedî sed behsên wek girêdana peymanek dumilî ya "Peymana Portsmouth" ê neanîn holê êdî behs bû behsa "xebata mûşterek a li dijî dijminê hemû-yan - komunizma cîhanî !!!". Vê yeka han heta nîvê sa¬ lan 50'an ji bo îmzakirina "Peymana Bexda"*44) rê çêkir.
Di bin sîya rêbaza sîyasî ya nû de, kolonyalîst û kevneperes¬ tên hindûr bi awakî fireh û lêkolîn, bi hînîtî ketin nêçîra ke¬ sên ku di mewzîyên welatparêzîyê de bûn, hewil dan wan big¬ rin an qet nebe ber bi şaşîtiyê de bibin. Eynî wexti gelek ji berê zêdetir ketin geşkirina agirê dijîtî û nakokîya navbera hazên netewî. Ji ber ku dixwestin dijminên xwe bi kar û problemên cûda cûda mijûl bikin. Serokê Partîya îstîqlal, Mihemmed Mehdî Kubbe di bîranînên xwe de aşkera li ser vê mesele sekinîye û dibêje ku karbidestên hewil dan bi wasita grubek we-

43) Kolonyalîzma nû, yanî "Neo-colonialsm", ji kince nû yên emperyalizma

cîhana pekhatî ye. Dewletên emperyalist di bin dexma bi hezbûna tevgeren rizgarîxwazen gelan û çêbûnê cepheyek sosyalizme ya fireh de, neçar bûn ji bo bicîkirina armancên xwe yen bere, dest bavêjin awaye karen din, ji ber ku ruswabûna awaye çaren bere êdî feyde nedidayê. Naveroka kolonyalîzma nû ji "emperyalizm be wel¬ atê bindest" pêkhatîye. Yek ji rûyen herî girîng ên kolonyalîzma nû,

xebat ji bo ber bi xwe ve rakeşana burjuwazîyên netewî ye, yan qet nebe danîna daviken mezin li ber wan e.
(44) Herçiqas di zimanê Kurdî de "peyman" di cîyê "mu'ahede" de te bikaranîn jî di rastîya xwe de raste rast te ma'na "helf". Rekkettiname (rêkkevtinne-Elîşer.) jî bi ma'na "îttifaqîye" ye. Hêjayî gotine ye ku Awrupî gotina "pact" ji bo "helf bikar tînin.
192
latparêzan ber terkexemîyê ve bibin da ku di wê riya re "bi tîrek du nîşanan bbcin..."*).
Lê, ew dersên ku emperyalîstan ji serîhildana mezin a Kanûnê wergirtin, wek dermanekî bi tesîr ê dema wisa bû ku derdê mirinê kiribû nav dilan. Gelê lraqê taze carek din , piştî ta'ma servkevtina Kanûnê ta'am kir, êdî bi van nedihat sekinandin. Xerakirina "Peymana Portsmouth", bi carek gelê Iraqê xist ser wê bawerîya ku dikare bi ser kevneperestiyê bikeve û welat ji destê bîyanîyan rizgar bike. Belgên dîrokî yên me¬ zin ên vê rastiyê di wê de tên xuyakirin ku gelê lraqê piştî Şoreşa Bîstan ji bo ku bikare tevgerek şoreşgerî ya din a wek vê berpa bike hewcedarê 28 salan dirêj bû. Piştî vê, çar sal bi ser re derbaz nebû, teqîna serîhildanek nû*46) hemû bi ser hev deh sal û çend meh nekêşa, şoreşa burjuwazî-demokratî ya gelê lraqê*) text û tacên rejîma paşatiyê bi carek ji holê rakir.
(45) Mihemmed Mehdi Kubbe, serokanîyê ku nave wê derbaz bû, rûpel: 218-219.
(46) Mebest jê ew serîhildana ku di sala 1952'an de qewimîye.
(47) Mebest je şoreşa 14'yê Tîrmeha ye.
193
MIJARA DANZDEHAN

ÇEND RÛPEL JI DÎROKA

ÇÎNA KARKER A KURD

Kêm nivîskarên me û yên bîyanîyan ser karkerên Kurd sekinîneC). Em dûr necin, tu berhemên Mamoste Emîn Zekî yê dîroknivîsê me yê mezin de, kêm an zade navê karkerên Kurd derbaz nebûye. Bêguman ev jî valatiyek din e ji wan dehan valatiyên ku di dîroka me ya nivîsandî de hene. Lê valatiyek mezin e. Ez wisa dizanim ez ê ji rastîye dûr nakevim ger ez be¬jim edebiyata kurdî jî gelek mixabin ji vê valatiya han bêpar nîne. Karkerê Kurd jî wek rewşenbîr, gundî û hemû xelkê din xwedî dil û hest in, dile wan wek hemû karkerên din saf û hes¬tê wan a wek ê wan bilind in, ew jî ji tevan zêdetir xwîdan dirijin û ji tevan zade diwestin û wextê wan kêmtir in, ji ber vê kêmtir behsa xelkê dike û zêdetir behsa westîn, derd, eziyet, nebûnî û bêmafîyê dike û hez ji alîkarîya hemû qewmandinan dike. Tehl li ba wê tehltir e û şêrîn li ba wê şêrîntir e. Ji hemû xwarinan lezzet digre. Wek tevan, ne dûr e hîn jî zêdetir, hez ji çavên belek, levan sor û hinariken pirncal bike, dema bi-

(*)

v ' Sibata 1979'an li kovara Rewşenbîrî Nwe de hatîye belav kirin (rûpel: 8-14).

xwestaya çavên wê jî dikarin bibûna wek ya baza!. Hejmarên wan zade û problemên wan pirtir in, ji ber vê, jîyana wan tijî çîrokên bêmîsal, destanên saf û tabloyên rengin in.. Heyf e destê edîben Kurdî ku pelên gulên wê yên nazik ku jîyana tenik a mejî ya êş û ahrana tehl nivîsandîye , bi zû negihîje gewher û elmasên vê xezîna han a dewlemend!

Em e di vê gotara de hewil bidin, bi kurtî çend milên serekî ya çêbûn û hatina holê ya çîna karker a Kurd bixin ber çavan ku dûr nîne bala xwendevanan bikişîne.

Di serdema herî kevin a şaristanîyetê mirovatiyê ve karker û karbidest hene. Lê heta peydabûna nizama sermayedarîyê, di tu wext û tu cîyek de ev karkerên han ên belav û welav di ci-vakê de nebûne hêzen bingehîn ên berhemanînê. Li gel peydabûna sermayedarîyê re du çînên nû hatin holê: burjuwazî û karker. Ji ber ku peywendîya sermayedarî li Awrupa berê ciyên din durust bû, her li wir dor û berê sedsala 14 û 15'an cara yekem di dîroka mirovayetîyê de çîna karker wek hêzek dîyar a civakê hat holê(l).

Di piranîya welatên din, bi taybetî li Rojhilata Navîn û Nêzik de, çîna karker gelek piştî van cîyan çêbû. Sebeb û awayê durustbûna wê jî ji ya van deran gelek cihêtir e. Li Awrupayê, guherîn û serûbinîyên nav civakê çîna karker durust kirin, lê li welatên Rojhilat van guherînên han ji bo ku bibin sebebê têkelbûna nav bazara sermayedarîyê, kêmtir rol lîstin. Di sedsala 19'an de têkelbûnên lehîyên welatên Rojhilata Navîn û Nêzîk bi bazarên sermayedarîyê cîhana re destpê kir. Ev û gihîştina hejmarek destkevtiyên pîşesazîyên nû yên Awrupayê, bûn sebebên danîna kevirên hîmî yên durustbûna çîna karkerên piranîya welatên vê navçê.

*) Yekem car di dîroka mirovatî de peywendîya sermayedarî li Florensaya Italya durust bû, ji ber vê li vir jî yekem zîldana herdu çînen nû yen civakê; proletarya û burjuwazî peyda bûn.

195

Li Kurdistanê, ev bûyerên han ji ber hinek sebebên girîng,

heta derecek ji van welatên paş de ma. Ya yekem, peywen¬ dîyên zade tund ên hazên derebegî û jîyana paşdemayî ya koçerî û nîvçe koçerîya nav civakê Kurd bû. Ya din, nebûna melbendekê serbixwe bû ku kel û pelên (kelmelên) Kurdistanê û berhemên mamul ên pîşesazîyên Awrupayê tê de bicive, pêwistî hejmareke zede karker û çend kompanyan be.
Lê li hemberê vê de, mercan din ên pêwistî yên ji bo du¬ rustbûna vê çîna nû di saha de bûn. A yekem dewlemendîya Kurdistanê ye ku berhemên zîraet û heywanan di nîvê duyema sedsala 19'an de gihîştin çend bazarên girîng ên Awrupayê. Kel û pelên durustkirî yên wan jî bi awakî hêşan gihîştin dûrtirîn bajêr û gundên alîyên me. Heta berê nîva duyema sed¬ sala 19'an, îngilîzên kompanyan taybetî di bajarên wek Dîyarbekir de damezrandin. Ne vala ye ku G. Napier pêncî sal beri niha (di 1919'an de-Elîşêr) navê Kirmanşa danîye bendera kel û pelên îngilîz û Hindîyan(2).
Ya duyem, pêşdaçûna bajarên Kurdan û hêzbûna pey¬ wendîyên bazirganîya wan li gel bajarên din û pêşkevtina pîşesazîyên xumalî ne. Di vê rîyê de demek dirêj Kurdistan mil bi milê melbendên din ên Rojhilata Navîn û Nêzîk gavên ber bi pêşçûnê de avêt. Di riya hejmar û muqayesekirinê de em bi dilek xweş dikarin bêjin ku di Qerna Navîn de bajarên Kur¬ dan di gelek milan de wek bajarên din ên Rojhilat, fireh dibûn û ciyê xwe digirtin. Gerokê Tirk ê navdar û serokanîyê hêja Ewlîya Çelebî (1611-1679) ku di nîva sedsala 171an de hatîye Kurdistanê, di cilda çaran a "Seyahetnama"(3) xwe de behsa hejmarek bajarên mezin ên wek Dîyarbekir û Bedlîsê kirîye. Wek ew bazar û karwanserayên Dîyarbekrê ku ew behs dike,

wî çaxî di gelek kêm navçan Rojhilat de hebûne. Li gor gotina
*2) CNapier, 'The Road from Baghdad to Baku", The Geograhical Janrnal. London, Vol LIII, No: 1. January 1919, p.18.
*) Deh cild e û ji bo behsa welatên Rojhilata Nêzîk û Navîn a dor û berê dawîyê Qerna Navîn serokanîyek heja ye. Ewlîya Çelebî beşek zede ji jîyana xwe di nav navçan Imparatorîya Osmanî û çend welatên Awrupayê de borandî ye.
196
wî,12 germavên (hemamên) giştî li Dîyarbekrê hebûne û 140 mal jî germavên wan ên taybetî bi xwe hebûne. Li Bedlîsê, 5 germavên giştî û 600 jî yên ku germavên taybetî tê de hebûne. Ev hejmarên han ên dawîn, belgên gelek bi mana yên dewlemendî û refaha ne(4).
Dor û berê 150 sal piştî Ewlîya Çelebî, nûnerê bi nav û deng ê îngilîz e li Iraqê C.J. Rich, behsa çend bajarên din ên Kurdista¬nê kirîye. Gotinên wî jî belgen dîrokî ne di derbarê guherîn û ber bi pêşdeçûna bajarên Kurdan de. Sine, 5 000 mal nivîsandîye ku çend kêm jî bêthesêbkirin nifusa wî ji 20 000 ke¬san derbaz dibe. Dema ku em vê bi nifusa hin bajarên re bidin muqayesekirin mana vê hejmara han a zade hîn baş tê femkirin. Hejmara danîştiwanên bajarê Qudsê, di sala 1814'an de dor û berê 12 000, di sala 1831'an de ya Bexdadê nêzîkî 20 000 û ya 'Emman a paytextê Urdunê di sala 1880'an tenê hezar kes bûye(5).
Peywendîya bazirganî ya navbera bajarên Kurdistanê bi xwe û ew melbend û navçen nezîkî wan bûn, bi peywendîyên qonaxa derebegî xerab nebûn. Li gor serokanîyên kevin heta sed¬sala 19'an jî Stenbol, Şam, Heleb û Beyrut heta derecek zade li

ser mî û bizinan Kurdistanê rêve diçûn. Tenê ji bajarê Stenbolê re her sal milyon û nîv serî pez ji Kurdistanê diçû. Ew ordîyên mezin ên ku di bin serokatîya Îbrahîm Paşaya kura Mihem¬ med Elî yê mezintirîn fermanrewayê Misrê ku salen 1831-1832 û 1839'an êrîş birin ser Surîyê, li ser pez û dewarên Kurdistanê

*) Li gor gotina Şemseddîn Samî, hejmara danişîiwanên Mîrektîya Bedlisê 30 hezar kes bûye. Serokanîyên din li dor û beren 50 hezaran dinivîsin. Binêre: Şemseddîn Samî, Qamusu'l E'lam, cilda duyem, rûpel: 1329.

M.Y.Şemsî, Şerefnamê Şerefxane Bediîsi wek Serokanîyê Dîroka Gelê Kurd, Baku, 1967, rûpel: 16.

*) Binere: L.N.Katlov, Peydabûna Tevgera Netewî-Rizgarîxwazî li Rojhilata Ereb, bi zimanê Rusî, Moskova, 1975, rûpel: 90-91. Hejmara danişîiwanên 'Emman a paytextê Urdine, îro ji milyonek derbaz dibe.

197

dijîyan(6). Berê ku sedsala borî xelas be, tenê ji Stnenbol, Heleb û Bexdadê re her sal sê milyon pezên Kurdistanê dihatin.

Ji Bendera (liman) Samsuna re jî tenê sala, 20 milyon hêkên Kurdistanê dihatin(7). Durustkirina Pira Cjilyasan ji alîyê dewlemendek Silêmanîyê ve, tenê karek xêrê nebû, hekene dibû di cîyê Qilyasan li Tancero durust bikira, ji ber ku ava wî zêdetir û metirsîya lehîyan jî zêdetir bû.

Eynî bi vî awayî, pîşesazîya xumalî ya Kurdistanê, beri têkelbûna nav bazara sermayedarî ya cîhana, demek baş pêş de çû û qet ji pîşesazîya welatên dor û beren xwe kêmtir nebû. Cilbergên netewî û birek urf û adet, bi taybetî hêvînek baş a vê ber bi pêşveçûnê bûn. Cardin di cilda çaran a "Seyahetnama"

Ewlîya Çelebî de gelek belgên bi qîmet û bi mana di vî warî de dest dikevin. Li gor gotina wî, di seranserê cihana de mîsalên wek zêrkerîya Dîyarbekrê kêm bûne. Wek dibêje, kara berrik û çêkirina xaliçe û debaxxanên Bedlîsê deng dabûn, bi derecek wisa ku "çermê wir dîyarî dibirin Fransaye".

Piştî dor û berê 200 salan, yanî nîvê sedsala 19'an Taylor e gerokê Awrupî di wê kitaba xwe ya ku bi navê "Geştek di Kur¬ distan de" belav kirîye, behsa mitayên hevrîşm a Dîyarbekrê dike û başîya wî bi hevrîşmên Helebê re muqayese dike, di¬ bêje ew erzantir difroşin, ji ber vê ew navçen dikevin ber Dîyarbekir û Behra Reş, bazara wan germ e(8). Ji bo vê mijara ku em behs dikin baştirîn nimûne ev yeka han e ku li bajare Si¬ lêmanîyê bi navkirina taxek bi navê "Sabunkeran", tiştek manadar e. Qasek berê Şerê Cihana yê Yekem, dehan aîlên

*) Ji bo van hejmarên binere: Peter Lerx, Lêkolîn di Derbarê Kûrden Irana û Kildanîyen Bakur en Bab û Bapîrên Wan, bi zimanê Rusî, ki¬ taba yekem, Petersburg, 1856, rûpel: 24.

(7) Binere: B.Nikitine, Les Kurdes, Paris, 1956, p. 185.

A.R. Ghassemlou, Kurds and the Kurdistan, Prague, 1%5, p.104.

*) Binere: W.L.Wilçewski, "Jîyana Aborî ya Kûrden Koçer en Pist Qafqasê û Navçan Nêzîk di Nîva Duyem a Sedsala 19'an de", bi zim¬ anê Rusî, kovara Etnografya Sovyet, hejmar: 5-6, 1936, rûpel: 150.

198

(xêzanên) vê taxê bi çêkirina sabuna ve mijûl dibûn(9) û sala bi kêmasî 500 ton dianîn bazarên bajêr û der û dorên wî û çend melbendên din, heta ji vir jî digihîşt bajarên wek Bexdad û Tebrîzê(lO).

Li Kurdistanê jî bi awayê navçan din ên Rojhilata Nêzîk û

Navîn, têkelbûna bi zû di nîva duyema sedsala borî di nav ba¬
zara sermayedarîyê cîhana, li ser pîşesazîya xumalî tesîrê
mirinê kir ku tek û tûk dikir ber bi qonaxa manîfakturîye(ll)
ve biçe. Kara binemala Mutabçî ku li Silêmanîyê cuwal durust
dikirin, bi sera xwe nivçe-manîfakturî bû; karkerên bi heq tê
de kar dikirin, heta derecek wasitên hilberînî yên pêşkevtî
bikar dianîn, teqsîma kar(12) tê de sîma xwe ya ronak wergirtibû(
13). Cura durustkirina topên hoste Receb li Rewandizê
nimûnek din a vê rastiyê ne. Nav û dengê topên ku ji bo Mîrên
Rewandizê durust dikir deng dabûn(14). Piranîya wan 80 topên
ku li alîyê Musilê hebûn, destkarê karkerên Rewandizê bûn.
Hêjayî gotina ye, ew madenên ku ji bo durust kirina topan bi-

*) Li gor hejmartina sala 1947'an li Silêmanîyê tene 5-6 kes bi çêkirina sabuna ve mijûl dibûn. (Binêre: "Ihsa el-Sukkan", el-cuz'i sanî, Bexdad, 1954, rûpel: 163).

*) Ji derveyî sabuna berhemen din ên pîşesazîya xumalî ya Kurdewarî digihîştin bajar û welatên din (Binere: R. Berliner und Borchardt, Silberchmidsarbeiten ans Kurdistan, Berlin, 1922, p.8).

*) Manîfaktur gotinek e ku ji du kelimen latînî pêkhatîye: "Manus" yanî dest û "factura" yanî çekilin. Gihîştina pîşesazîya xumalî bi qonaxa manîfakturîye, yekemin gava girîng e a ber bi peywendîya sermayedarî de. Manîfaktur bi Erebî "urşe" ye.

* ' Li gel peydabûna peywendîyên sermayedarî, dabeşkirina kar zêdetir qayîm dibe. Di vê qonaxê de bi gelemperî kare çêkirina berhemek diket ser mile kesek yan ferdan aîlek hemû. Dabeşkirina kar dibe sebebê başbûn û zedebûna berhem.

*) Dr.Emîn Mutabçî ve behsa han ji min re neqil kirîye, nîyeta wî heye ew jî di vî warî de gotarek binvîse.

' ' Topên wisa te de bûn ku dirêjîya wan sê metre û lûlen wan ji 45 santîman kêmtir nebûn.
199
kar dianîn li dor û berê Rewandizê bi wasita karkerên kirîgirtî dihatin derxistin(15). Ji alîyê çêkirina berr, carim û çoxe de jî guherîn ber bi çêbûnê de bûn.
Lê heta van cure pîşesazîyên han jî nedikarîn xwe li ber lehîya kel û pelên erzan û baştir ên kargehên Awrupayê ragir rin, ji ber ve, di pey hev de dam û dezgên xwe paçan. Kartsov, sala 1896'an de wiha nivîsandîye: "Wextek çoxên Kurd bi nav û deng bûn, lê niha qumaşên îngilîzên bi carek wan kirîye tengîyê"(16).
Ew yek du dikanên fişekan ên ku piştî Şerê Ghanê yê Ye¬ kem, xwedîyê wan li Silêmanîyê bi ziktêrîyek nemir-nejî dijîyan, paşvemayên (bermayên) 150 dikanên ji xwe mezintir bûn ku Mark Syks berî şerê li wir dîtine(17).
Her çawa be, di van cure ciyên karan pîşesazîyên xumalî ve mijûl bûn û gavên baş ber bi pêş ve avetin, qalikên pêşîn ên tenik ên çîna karkerên Kurd dihat xuyakirin. Di milek din de bela vê pîşesazîya li dahatuya çîna karkerên Kurd ket, ji ber ku beşên zade kargerînên wê çûn nav rêzên wê. Bindestiya de¬ rebegî jî ji alîyê xwe ve bi hezaran cotkaran rût, reben, belengaz û birçî anîn bazara kara bajarên û ew p, bi taybetî ji ber erzanîyê, bûn serokanîyê herî girîng a durustbûna çîna nû ya ci¬ vakê. Hejmara van cure kesên han ku li hinek navçan ji wan re hejar (feqîr, reben, belengaz-Elîşêr)) digotin, carên wisa hebûn zêdetirî nîvê danişiwanên vê melbendê pêkdihatin. Li gor hinek serokanîyên, wan li navçek wek Şino (Uşnû) yê nêzîkî

Mahabadê, ji sedî 80'yê haza kar pêkdianîn (ji 12 000 10 000 kes)(18). Nimûnek wiha tenê, dikare di Çjerna Navîn li Ingîl-

*15) Binêre: Enwer Mayî, El'êkrad Fi Behdînan (Kurd li Behdînan), Musul, 1960, rûpel: 3.

*) A.Kartsov, Not di Derbare Kurd de, bi zimanê Rusî, Tiflis, 1896, rûpel: 24.

*) Binere: CJ.Edmonds, Kurds, Turks and Arabs, London, 1957, p.80.

* ' Binere: G.B. Akopov, "Derbare Karektera Axa Taybetî ya Kur¬distanê Îro de, kovara "Xeberen Akademîya Zanyarî ya Ermenîstana Sovyet", bi zimanê Rusî, Erivan, hejmar: 5, 1964, rûpel: 67.

tere hebe, yanî dema ku ji ber sebebê qezenca zade ya heywanan, dewlemend û desthilatdarên vî welatî zevîyên xwe diki¬rin çêrîngeh û bi vî awayî bi hezar cotkar bê cî û war diman û ber bi daristan, dest û bajarên ve diqewirîn û bê dirûngeh û gîya bi bermayên xelkê dijîyan, ev yek e ku hestê Thomas More(19) yê bi nav û deng wisa lerzandîye ku "Ûtopya" binivîse û gotina xwe ya bi nav û deng : "Nêzîk e mî însanan bixwe" bêje. Di vir de ya ecêb eva han e ku derd û ezîyeta feqîrên Kurd jî hestê şairan bilind kirîye û behsa vê yekê ki¬rine ka çawan birçîtî li Kurdistanê zehmetîyê ji bo tevan anîye û bi revên mezin ve ber bi fabrikan ve(20) hatine(21). Hejmara feqîrên bajêr û bi taybetî ya gundîyên Kurdistanê ewqas zade bû ku di daxilê quweta hatinên wan bazarên kêm ên nav welat de nebû feyda beşekê gelek kêm jî bide. Bi herîçêkirin û hemalîyê pê ve karek din ê wisa dest nediket. Ji ber vê, bi hezaran feqîrên Kurd beren xwe dan ber bi bajarên

mezin en wek Stenbol û bi hemû cura kar û bihayan qayîl dibûn (berê Şerê Cîhana yê Yekem hejmarek bê hesab ji hemalên rût û reben ên Kurd di bazarên Stenbol, Bexdad û yên bajarên din de bûn). En wisa hebûn ku ji ber belengazîyê diçûn bajarên biçûk ên wek Heleb, Şam, Beyruta Lubnanê û Edene ya Tirkîyê, yan navçan wek Aqçem û Qerebaxa Azerbeycanê. Lê îmkanên kara bazarên van cure navçe û bajarên jî ewqas tunebû alîkarîya vî xelkî han ê zade bide ku di ser de jî dibûn sebebê bêkarîya wan. Ji ber vê, her zû hejmarek ji van bi naçarî çavên xwe kirin welatên derve û xwe bi destê felekê ve berdan û gelek ji van Deryaya Atlasa borîn û gihîştin axa Amerîkayê. Piranîya van kesan xelkê Dêrsimê bûn(22).

* ' Sîyasetvan û nivîskarê bi nav û deng e îngilîz Thomas More (1478-1535) damezrênere bîr û bawerîya sosyalîzma Utopî têt hesêb kirin.

* ' Diyar e mebesta wî fabrikan derveyî Kurdistanê ne.

*) Binere: G.B.Akopov, serokanîyê ku navê we derbaz bû, rûpel: 67.

* ' Binere: W.Vilçêvski, "Derbare Peywendîya Zîraet (Kist û Kal) li Kurdistanê", kovara Problemên Zîraetê, bi zimanê Rusî, Mos-201

Ji ber hebûna kanîyên madene li navçan Kurdewarî û dor û berên wî, berê Şerê Cîhana yê Yekem ji bo peydabûna kara kirîgirtî li wan deran sebebek arîkarî bû. Wî çaxî beşê zade yê karkerên hewza madenên Zonguldaxê Kurd bûn. Kurdan Colemêrgê hesin, sifr (baqir) û zernêx derdixistin û ji ber vê, navê yek ji van navçan wî bû Meydana Zernêxê. Beşek ji van zernêxên ku li vir dihatin dencistin, dişandin bazarên derve. Li gor

hejmarek serokanî, sala 30 000 qenter (qenterek 56,452 kîlo ye-Elîşêr) ji vî madenî dihat Stenbol, Bexdad û Hindîstanê(23).
Her wî çaxî hejmarek Kurd bûbûn karkerên hewzên madenên nêzîkî Kifrê ku berhemên salane yên karan wan, berê Şerê Cîhane yê Yekem û salan şer de hezar ton dibû(24).
Bûyerên Şerê Cîhana ye Yekem, bûn sebebê berfirehbûna hej¬marek karkerên Kurd ên curek hessas. Kurdistan bi xwe bû yek ji wan bingehên şerê yên dîyar ên Rojhilata Navîn û eskerên çar dewletên rijîyan ser. Agirê şerê piranîya wan navçan ku nêzîkî Kurdistanê ne jî girt. Wek aşkera ye teknik gelek bi zû rolek mezin di vî serî de lîst, ji ber vê, di her çar alîyan de dest avêtin çêkirina rê, ban û damezrandina bingehên eskerî.
Bi hezaran feqîrên Kurd di wan ciyan de bûn karker. Ev bûyerê han a nû, bi temambûna şerê dawî lê nehat. Ji bo nimûne sala 1925'an zêdetirî 2250 Kurd li Iraqê karkerên riya hesin bûn(25). Li gor hinek serokanîyên bawerpêkirî, nîva sa¬lan 1920'î de ev karkerên han ji sedî 23'ê hemû karkerên Iraqê kova, cilda 1 û 2, 1932, rûpel: 130.
Musa Kazim Paşazade, ilhan, Adat-i Ekrad, Stenbol, 1921.
Min ji Dr.Nacî Ebasî wergirtîye, ku di wextê xwe de li bajare Detroitê rastî grubek wan karkerên Kurd hatîye.
*) Binere: W.L.Vilçevski, "Jîyana Aborî ya Kûrden Koçer en Pist Qafqasê", rûpel: 151.
W.L.Vilçêvski, "Derbarê Peywendîya Zîraet li Kurdistanê", rûpel: 130.
*) Binêre: Abdurrezaq Hesenî, El-Iraq Qedîmen we Hedîsen, cuz'i sanî, Sayda, 1958, rûpel: 61.
*") Binere: Iraq Railways, Administration Report for the year

1924-1925, Baghdad, 1925, p.16.
202
yên rîya hesin bûn(26). Gelek ji van hejmarên jî zêdetir ku ev yeka han di vir de jî îspat dibin ku piranîya xetên rîya hesin a wî çaxî ya Iraqê li Başûr û navenda welat (mebest Kurdista¬ nê lraqê ye) de bûn û ji derveyê Ereban(27) û Kurdan hejmarek zade Hindî (1 142), Iranî, Ermeni, Asurî, Tirk û yên din, karke¬ rên van dezgên han bûn.
Cardin pişti Şerê Cihana yê Yekem hejmarek yekcarî zade ji feqîrên Kurdan bûn karkerên neft û damezrandina borîyên wan, durust kirina rê, ban, xanî û tiştên din. Dawîyê salan 1920'an li hemû lraqê 4250 kes bi durustkirina rê û banan ve mijûl dibûn(28) ku hejmarek zade ji van karkerên riya navbera Kerkuk-Silêmanî, Kerkuk-Hewlêr, Hewlêr-Musil, Hewlêr-Rewandiz-Rayat bûn. îngilîzên qîmetek zade didan riya dawîyê, yanî Hewlêr-Rewandiz-Rayat, ji ber ku ji derveyî qîmeta wê ya stratejik, dbcwestin viya bikin yek ji wan wasi¬ tên herî girîng ên girêdana bazarên rojavayê Irana bi cîhana sermayedarîyê ve, çiqas ji wan bê xwestin ewqas peywendîya aborî ya vî welati bi Sovyet re kêm bikin(29).
Karkerên Kurd, yekser dilsozîya xwe ya kar û imkanên hînbûnê gelek bi zû nîşan dan. Gelek belgên ecêb ji bo vê rastiya han di dest de hene. Ez wisa dizanim ku ji tevan girîngtir di vî warî de hev û du girtina nincandina karbidestên îngilîz û Al¬ manya nin, demek ku du kozikên cihê de dijî hev sekinîbûn. Almanî di destpêka Şerê Cîhane yê Yekem bi lez ketin çêkirina wê beşê proja navdar a xeta riya hesin a Bexdade ku hîn temam nebibû. Bi vî awayî xetek di navbera Bexdad û Se-

(26)
v ' Binere: Report by Britannic Majesty's Government to the Conucil of the League of Nations on the Administration of Iraq for the year 1926, London, 1927, p.29.
*) Hejmara wan 4 059 kes bû, yanî du car ji Kurdan kêmtir.
*) Binere: Report of the Majesty's Government in the United Kingdom of Great Britain and Northern lreland to the Council of the League of Nations on the Administration of Iraq for the year 1931, London, 1932, p.66.
*) Ji ber sebebê nêzîkbûna, bazirganî ya navbera Rusya û navçen Qafqase gelek zû de zade bû.
203
merra de kaşan ku karkerên Kurd jî di çêkirina wê de beşdar bûn. Nivîskarê Almanî Dagobert di vî warî de wiha nivîsan¬ dîye:
Muhendisên Almanya di nav Kurdan de "baştirîn û dilsoztirin karkerên dîtine"(30) .
General Haldane yê fermanrewayê hazên îngilîzên li Iraqê dor û berê eynî wextî, bêyî ku bizane Dagobert kî ye yan raya muhendisên Almanya çîye, bi eynî awayî behsa karkerên Kurd kirîye û rizabûna xwe ya zade li hemberê wan nîşan daye(31). Her ji ber vê jî qet dûr nîne ku rojaneya karkerên Kurd ji yên din zêdetir be. Wî çaxî hinek dezgên dema ku yên wek van digirtin kar di cîyê 14 'ane, rojê nêzîkî 21 'ane didan (32). Ji vê jî manadartir ev nimûna han e: Dezga rîya hesin a îngilîzên li lraqê di salan 1920'an de du cur karkerên wan hebûn. Ya yekem ew karker bûn ku bi karan esasî ve (capital works) mijûl dibûn, a duyem jî ew bûn ku çêkirina xetên nû de

kar dikirin. Sala 1924-1925'an, ji 2 274'ê karkerên riya hesin ên Kurd tenê 729 kesan di cura kara duyem de bûn û qisme mayî yên din (1 545 karker) di cura yekem de kar dikirin(33).
Aşkera ye ev rastîya han nebûye sebebê tehl ku pelçiqandina karkerên Kurd ji ya hevalên wan kêmtir be, ji ber ku bi eksê vê, hejmarek serokanîyên wê demê wisa nîşan didin ku hinek caran û ji ber çend sebebên taybetî, pelçiqandina karkerên Kurd tundtir bûye. Di gişt navçan Bakurê lraqê de rojaneya karkerên ji yên navçan din kêmtir bûye. Wek mîsal karkerên kompanya madenên neftê, divîya heffiyê 54 seet kar bikin û li hemberê vê 7 heta 10 rûpîyan diştendin çi heye ku karkerên çinine li Bexda û kakerên Bendera Besrayê heftiyê 48 seet kar

*) Dagobert von Mikusch, Mustefa Kemal between Europe and Asia, trans. by J. Linton, London, 1932, p.360.

*) Binêre: A.L. Haldane, The Insurection Mesopotamia, London, 1922, p. 108.

*32) Binêre: El-Merkezu'l Wetenî Lîl Wesaîq, Bexdad, reqem 80/19, Establishment General.

*33) Iraq Railways, Administration Report for the year 1924-1925, p.16.

204

dikirin û beramberê vê heryek ji wan 3 heta 6 rupi zêdetir distendin(34). Rewşa kar û rojaneya karkerên Kurd ên ku bi karan avayî, rê û banan ve mijûl dibûn jî gelek ji vê xirabtir bû. Ew gelek caran bi banga sibê diçûn kar û bi banga îşayê re dest jê berdidan û beranberê vî karî hemû ser hev, rojê 18 fils dişten¬ din. Wek îngilîzên bi xwe jî vê yeka han qebul kirine, ev perê han tenê tara "beşê nan û cigara wan nedikir"(35).

Bi ser vê de karkerên Kurd, wek karkerên navçan din, demek dûr û dirêj nekarîn xwe ji peywendî û adetên derebegî xelas bi¬kin. Gelek caran ev karkerên han ji bo karan zîraet û alîkarîya kes û kusan xwe vedigerîn gundên xwe. Piranîya wan, beşek ji qezenca karkerîya xwe her wek carên din didan axa û serokeşîran xwe.

Di dawîyê de em vê yeka han jî bêjin ku gîyana biratiya karkerên Kurd di destpêkî de geş bûye, ji ber ku hemû ji wan, çi yên li ser erda xwe û çi yên vir dûr, mil bi milê karkerên din de xebat kirine, eziyet û bindestiya tam kirine. Xweştirîn belge vê rastîye ew gotinên ku bi temambûna rîya Hewlêr-Rewandiz-Rayat re li ser kevirek hatine nivîsandin:

"Em ku bi hezaran kes in û bi erebî, ermeni, ingilîzî, hindî kurdî, rusî û tirkî diaxivin, me vi riya han ji bo xizmeta hemû gerokan bi qeza û bela çi kir! "(36).

Lîsta navê van zimanên li dezga riya hesin a Iraqê digihîje 16 navan. Ji derveyî van ên jorê ev navên han jî hene : suryanî, misrî, farisî, tunisî(37), îtalî, yunanî û macarî (hungarî)(38).

Li Gawurbaxê jî havîna sala 1946'an dengê zelal û xwîna paqij a karkerên Kurd, têkelê nav deng û xwîna pîroz a birayen xwe bû û bi awazek bilind rûpelek gelek hêja nivîsandin!

*34) Report for the year 1926 p.29.

*) A.M. Hamilton, Road through Kurdistan, The Narrative of an Engineer in Iraq, London, 1937, p.61.

*36) Binêre: J.Morris, The Hashemite Kings, London, 1959, p.57.

*) Diyar e vir de mebest ji Misrî û Tunisî welat e, ne ziman.

*38) Iraq Railways. Administration Report for the year 1924-1925, p.16.

205

MÎJARA SEZDEHAN

XELATA "MEJÛ"

Pêşkêş e ji bo wan kesên ku tiştek di kîsê wan de nîne û gelek bi esi û esasen xwe tên zanîn, ji bo wan e ku gelek di kîsê wan de heye bi esi û esasen xwe nayên zanîn!

Dîyar e kes nebûye, kes nîne û kes nabe ku ji dil û can hez neke tişta binivîse bi dilê xwendevaran nebe, wiha nebûya ke¬sek qelem nedibir ser kaxezê. Ev bidilbûna han li seranserê dhanê pan û belav mezintirîn encam e ji bo herkesek berhemê bîr û bawerî, pênûs û bêxewîya şevan bike dîyarîyek hêja ji bo grubên hevzimanên xwe, lê ji bo Kurdek ji vê jî zêdetir e*) .

Qasek berê niha, ji çend milan de ji min re hat gotin ku berêz Dr.Ibrahîm Hilmî daxwaz dike da ku biçim serîlêdana wî.

Roja yekemin a Cejna Qurbanê berê xwîşk, dost û yaran min berê xwe da derîyê yek ji wan ê ku jê re dihat gotin, mezin û wekî em jî jê re dibêjin, pêşengê gruba rewşenbîrên. Bi yekcarî destpê kir:

"Lawê min, kiteba te ya Mejû bi dilê min bû, piştî xwendine min biryar da ku tu bikevî nav kitebxana min, va ye niha ve ez çend belge û berhemek peşkeşi te dikim".

*) Ev gotar ji wan gotaran e ku dibin temamkerê çapa duyem a we kitaba min a ku min di sala 1983'an de bi navê "Mejû" weşand. Ev go¬tar di rûpelên 10-15'yên hejmara 14'an a kovara Karwan di Teşrîna Duyem a sala 1983'an de hatîye weşandin.

206

Wê gavê ger mirov di cejnek Remezan an Cjurbanê de berê xwe bidaya Kurdistanê yan her navçekê din axa Musilmanan,

bi vê cura cejnek kesek din nedigîhand perê asîmanan. Bi vî awayî ez bi piştîyek cewher, mirarî û bawerî ve vegerîyam û min bi vê çav û dilê çend dostek xwe tijî ronî kir, va ye kurtîya yekemin berhemê wê dîyarîya bi qîmet dikim nav weşanên rewşenbîrên me yên îro.

Yekem : ÎCAZA ŞEX SERACEDDÎN JI HACÎ RE¬
SULE NEÇjŞÎBENDÎ RE

Dr. îbrahîm Hilmî ji binemalek naskirî ya ji bajare Silê¬ manîyê ye*1). Kura Hacî Fettahê kura Mele Qedrîyê kura Hacî Resulê kura Mehmed Axayê kura Gudrun Axayê kura Rustem Axayê kura Zorab Axayê kura Zulal Axayê Mergeyî ye. Zulal Axa yek ji wan danzde siwarên Merîwanê re bû ku Pîremêrdê nemir di destana xwe de çend carek bi taybetî navê wî bibîr anîye*) .

Dema ku Birahîm Paşa bingeha bajarê Silêmanîyê danî, merkeza Mîrnişîna (mîrekî, derebegî, fermanrewatî-Elîşêr.)

*D Sala 1909'an li Silêmanîyê ji dayîk bû. Di destpekî de li hucrê li ba Xoce Efendi xwend û veca çû dibistanek destpêkî û sala 1925'an temamkir. Sala 1932'an dibistana navîn li Bexda xelas kir û ji bo temamkirina

xwendina xwe çû Qahîrê û sala 1937'an li vir lîsa (bakelorya) beytarîyê xelas kir û salek şûn de çû Tirkîye û roja 25'ê Teşrîna Duyem a sala 1940'an li vir doktora bakteriyoloji ya nexweşîya heywanan wergirt. Piştî vegere û heta roja teqawidîya (xanenişîn) xwe ya 23'e Gulana sala 1964'an memur bû, wek yekî destpêk e bêhempa navê wî belav bû. Gelek qîmet bi dîroka Kurd dida û di vî warî de çend gotaran wî di rojnama "El-Teaxî" de hatine belav kirin (Ji b° kurtîya jînama wî binere: Mehmud Cindî, Daîretu'l Me'arifu'l

lraqîyye'l-'Am, cilda yekem, Bexdad, rûpel: 15).
*2) Binere: Pîremerd, Diwanze Siwareyî Merîwan, çapa sayem, Silêmanî, 1983, rûpel: 8,10 û 33.
207
Baban ji Qelaçolan anî vir. Mehmed Axayê nevîyê Zulal Axa
*) yek ji wan mirovên maqûl bû ku bi mal, zarok û tekya xwe
ve hat bajarê nû yê Kurdistanê. Piştî danzdeh salan, yanî dor
û berê sala 1796'an, Xwedê Resul Axa da Mehmed Axa.
Navê Resul, gelek bi zû wek xortek kêrhatî, zîrek, mêr, we¬
latparêz û ji Xwedêtirs belav bû û wî berê xwe da Mekke û
Medînê. Piştî vegera xwe bû Hacî Resul. Her bi vî awayî riya
Neqşîbendîye ket serî û bû murîdek wî yê dilsoz. Gelek ser de
derbaz nebû, Hacî Resul tekyek li tenişte mala xwe durust kir
û hemû erkê rêvebirinê girt ser milê xwe.
Deng û behsên Hacî Resul ket ser deva mirovên hêja yen bajêr
û dor û berê wî. Sewda Neqşîbendîyê bû pûşî (kermêş) û ket
kevlê (post), bi lez berê xwe da Biyare û çû xizmeta Şêx Seraceddîn.
Dilê Şexê mezin ê Neqşîbendî wî ser Hacî Resul
rûdine û gelek bi rêz ve îcaza îrşadê didê. Deqa vê îcaza gelek
bi qîmet ku niha temenê wê digihîje taml50 salan*4) , yekemin
dîyarîya hêja bû ji bo "Mêjû".
Pîvana îcaza Şêx Seraceddîn 34x21 santim e û ji 23 rêzan
pêkhatî ye, bi desbcetê zana û şairê bi nav û deng Mele Hamid
ê katibê Şêx, bi xetê farisî hatîye nivîsandin. Pênc rêzên destpekî
erebî, yên din farisî ne. Muhr û imzaya Şêx Seraceddîn li
ser milê çepê ye. Eva deqa destpêkî ya erebîya wê ye :
"Elhemdû lîllahî ellezî ce'ele qulube ewlîyaehû elkamilîne
mehka lîneqît el-wucûd

we sîr qubulîhim 'elametûn lîqubulîhî wel îqtîdaî
bîhedahum murqad lîl 'urûc ila 'ela
me'aric eşşihûd wemeyyeze min beynîhîm essade el-
Tlîyye el-Neqşîbendîyye wexessehum
bîmezaye lateuddû wela tuhze mînha înne nihaye seîr elturûq
munderîc fi bidayetihim
feyuqassû 'ela haza şe en kemal terîqetîhim we hal
nîhayetîhim...".
Piştî vê destpêka cardin bi farisî behsa rêbaza
*3) Hemexayan jê re digotin.
*4) Sala 1251'ê koçî dike 1835'e zayînî
208
Neqşîbendîtî û milên wî yên taybetî dike ku çawan ser binge¬
ha dînê Islama hatîye damezrandin û qet tiştek ji dûrê dînê tê
de nîne û heta yên di terîqetên din de, di rîya çilekêşan û
rîyazîkirinê ve peyda dibin, li ba Neqşîbendîtîyê di rîya
hevrêyîya mirovên baş û pîrên terîqetê ve tên holê. Piştî vê tê
ser behsa Hacî Resul û dibêje yek ji wan kesan e ku bi dil pêsîr
girtê rêbaza Neqşîbendîyê bû û hemû payek wê rêbazê xelas
kir, "gihîşt dayîra wilayeta piçûk", ji ber vê ku bi fermana
cîhana gîyanê pîran û terîqetê nîsanê xelkê bide rîya pîran
bigre û "xitma xocan" bike. Piştê vê dibêje hevîdar in Hacî Re¬
sul di vê rîyê de gelek bilind be û em doza ji wan kesan jî dikin
ku daxwaza wan a girtina rîya rêbaza Neqşîbendîyê heye,
dest bidin destê wî û ji wî hînbin û îstifadek ji hevrêtiya wî
bikin, ji ber ku tijî bereket û bextewerî ye.
Piştî wergirtina vê belgê, Hacî Resul hîn zêdetir ket hewildan
ji bo berfirehbûn û belav kirina rêbaza Neqşîbendîyê, vî

karî han dijîtîya grubek desthilatdarên navçê li hemberê wî peyda kir, ji ber ve naçar bû bajarê Silêmanîyê bicî bihêle û berê xwe bide Gergeder a navça Sûrdaşê ku gundê wî bû û heta dawîyê jîyana xwe li vir nişstecî ma. Piştî mirina wî ya sala 1286'ê koçî (1869/1870'yê zayînî) meytê Hacî Resul tinin Silêmanîyê û li Gira Me'fwan a Gorristana Seywan diveşêrin.

Berê ku Hacî Resul Silêmanîyê bicî bihêle, tekya xwe dispêre Mele Osmanê Balexî ku zanayek naskirî û ser rêbaza Neqşîbendî û xwedî îcaza Şêx Bahaddînê xelîfê Şex Seraceddîn bûye û pişti koça dawîyê Hacî Mele Elîyê kûre wî têt ser ku ew jî zanayek heja bûye û ji wir şûn de êdî tekya dibe "Tekya Mele Elî" ku heta niha jî maye.

Duyem : MIHEMMED ELÎYE MEZIN Û KURD

Hemû ansîklopedî û kitêbên dîroka yên nû yên Misrê, dema ku behs têt ser Mihemmed Elîyê Mezin dibêjin bi esle xwe Arnawud (Albanî), danişstiwanê bajarê Qewele*5) û di destpekî

(5) Di serokanîyên Ingilîzan de "Qewele" dinivîse. Dûr nîne Qole ji "qel'e" ya Erebî hatibe. (Tirk jî Kavalah Mehmet Ali dibejin-

de tutinfiroş bûye.

Dor û berê xelasîya sala 1949'an ji bo bîranîna sedsalîya koça dawîyê ya Mihemmed Elîyê Mezin, nivîskarê bi nav û deng e Misrî, Ebbas Mehmud 'Eqad, bi navê kovara "El-Musewwer" hevpeyvînek taybetî li gel cîgirê Faruq Paşa yê wî çaxî yê Misrê kirîye ku ji ber navê bapîrê xwe yê mezin navê xwe danîye Mihemmed Elî. Dema ku behs hatîye ser regeza Mihemmed Elîyê Mezin, cîgirê textê Paşaya Misrê, wiha gotîye:

"... Di derbari binemala 'Elemi *) ez i ji te re tiştek bijim ku dikare bibe sebebi ecibmayîna gelek kesan. Wisa belav e goya ev binemala han li nizîkî Qole ya melati Arnamudi de *) durust bûye li ya ku min di riya kitibek Oazîyi Misri yi demra Mihemmed Elîyi Mezin ve zanîye, ev binemal di bingehîna xme de ji Dîyarbekrê melate Kurdan hatîye, ji vir babe Mihemmed Elî û du birayin xme çûne Qemele, piştî vi yek ji mame Mihemmed Elî çûye Stenbol û mame din jî ketîye pi bazirganîye û teni babe Mihemmed Elî li Qemele maye. Mir Helîm jî y ' regeza binemala me digihand Dîyarbekrê melate Kurdan û ev yeka han jî gotina qazîyi Misri xurttir dike".

Wisa dbcuyê ev gotinên Mihemmed Elî yê cîgirê textê paşatî ye Misrê ye wî çaxî, telê hestê Ebbas Mehmud 'Eqad şidandîye, ji ber ku wek bi xwe jî nivîsandîye, ew jî bi eslê xwe Kurd bûye. 'Eqad, her li wir berê xwe dide nevîyê Mihemmed Elîyê Mezin û jê re dibêje:

"Ev şeref û şanazîya han bes e ji bo welatê Kurdan ku du qehremanen nemir daye cîhana Islama: Selaheddîn û Mihemmed Elîyê Mezin...".

*°) Mebest binemala Mihemmet Elîyê Mezin e ku gelek caran li Misrê bi nisbet navê diduyan e hevedudanî Mihemmed Elî re digotin 'Elewî.

'') Mebest Welatê Arnawudan (Albanya) e.

*°) Yek ji nevîyen Mihemmed Elîyê Mezin bû.

210

Ev zanyarîyê han a ku kêm tê zanîn, di rûpela 56'ê hejmara

1311'ê roja 25'ê Teşrîna Duyem a sala 1949'an, "El-Musewwer" de hatîye çapkirin ku Dr. îbrahîm Hilmî bi wî awayî di kitêbxana xwe de wek belgek dîrokî parastîye. Di eynê hejmara de gotarek Hebîb Cematî bi vî navnîşanê belav bûye : "Kurd Dbcwaze Dewleta Xwe Damezrîne" û tê de bi taybetî behsa Mahabad û Qazî Mihemmed kirîye.

Binemala Mihemmed Elîyê Mezin bi regez Kurd be yan nebe qet vê rastiya han naguhere ku tu ferq di navbera gelan de nîne û Kurd jî ji tu kesî kêmtir nîne, hel û merc, rewşa wan, qonaxa cîyê gel, serdar û qehreman di pêvajoya dîroka de ten dîyar kirin. Wisa dixuyê gelek ji wan Kurdan zîrek û çalak ên ku rewşa jîyana Kurdewarî ya berê wan, nekarîye tînîtîya wan bişkîne, berê xwe dane navçan din û li wir bi kêrhatiyên xwe yên şexsî gihîştine bilindurîn paye û derecan.

Ji bo zêdetir ronîkirina vê meşe lê ez dibêjim çi xortên ku ji navçan bi qamîş ên Asya, daristan û sehrayên (bîyaban) Afrîqa li gel berfehmîya xwe bibin nav malbatek dewlemend a Ingiliz, dema ku mezin be wek wan kesên der û dorên xwe bi kevçik û çetel nan dbcwe, bi kêr fekî paqij dike, pîpo dikêşe, simokîn li xwe dike, wek wan diaxive û dicole, mimkun e ge¬lek ji wan zêdetir jî bibe pisporek navdar. Aşkera ye ku ger zarokek çavşînê Swêdî jî bînin navçek bi qamîş a paşdemayî dema ku mezin be, pêxas diðere, nexwendewar û paşdemayî dimine û ji her tiştî zêdetir hez ji goşt, masî û hatê (ranê) ordekan dike. Ger em bêjin Mihemmed Elîyê Mezin li welatê Arnawudan bimaya, mimkun bû bibûya bazirganek dewle¬mend û bi nav û deng, le nedibû ew mirovê sîyasî yê zîrek ku karî du car eskerên Sultana Osmanîyan bişkîne û bigihîje

navçan nîvdorgeha Ereb, Sudan û Surîyê û wisa lê bê ku hemû dewletên mezin hesaba wî bikin. Bêguman ne vala ye ku yeki wek Marks gotîye: "Misra Mihemmed Eli, perçek ji melati berfireh i Osmanî ye ku imkana jîyan û mani ti de heye". Hêjayî gotina ye ku Mihemmed Elî, demek kin berê koça dawîyê hînê xwendin û nivîsandina bûye!

211

Seyem : YEKEM SALA "GELAWEJ"

Destpêka sala 1961'an hevrêyê min ê hêja Dr.lzeddîn Mus¬tefa Resul du dîyarîyên gelek bi qîmet dan min, a yekem şeş cildên bîranînên Mamoste Refîq Hilmi*) û ya duyem jî hejma¬rên "Gelawêjê" yên sala sisîyan bûn.

Bi vî awayî, ez evdal bim (ez gorî bim, ez reben bim...-Elîşêr), hejmarên sala yekem û a duyem a vê kovara ku li ba min tûne bûn ketin destan min û hejmarên sala yekem jî Dr.lbrahîm Hilmî pêşkêşî min kirin û bi vê cura valatiyek mezin di kitêbxana min de tijî bû.

Min naveroka her "deh" hejmarên "Gelawêj" a sala yekem binçav re derbaz kirin*) . Ez bawer nakim kes hebe ku vê yeka han itiraf neke, weşandina "Gelawêj"ê bi rastî bûyerek mezin a jîyana rewşenbîrîya hevdem a Kurd e. Dîyar e her ji ber vê jî "Gelawêj" gelek bi zû di nav xwendevarên hindûr û yên derveyê welat de deng da. Edmonds, pişti weşandina sê hejmarên, di derbarê wê de wiha nivîsandîye:

"Gelawêj, stêrkek herî geş a asîman e, li ba Misriyên kevin mizgînîya deriye xer û berekete bû. Naveroka sê hejmarên peşin ên we, mizgînîya ve yeka han in ku navê Gelawêj bi xwe li ser e".

Li ba min beşên piranîya gotaran "Gelawêj"ê hêjane ne ku yan wek xwe yan bi bi destkarîyekî kêm cardin di rojname û kovarên kurdî de ben belav kirin.

Çarem : "LEHISTAN'A MEHMUD CEWDET

Yek ji wan kitêbên hêja yên ku berez Dr.lbrahîm Hilmî pêşkêşî "Mêjû" kirin, "Polonya-Polende ya Lehistan" a Xwedê

*') Cilda yekem, Xwedê jê razî be, Refîq Himî bi xeta xwe ve pêşkêşî Kak Izeddînê xoşewîst kirîye.

(10) Hejmarên 5-6. û 11-12. ên sala yekem a "Gelawêj" bi hev re derketine.

jê razî be Mehmud Cewdet e ku di rûpela 312'ê "Mejû" de navê wî derbaz dibe û demek e bûye yek ji wan berhemên kurdî yên hêja.

Dr.lbrahîm, wek hemû rewşenbîrên salan xwe bi dilek rêz û gîyan ve behsa wan welatparêzan dilsoz dike ku roja 20'e Teşrîna Duyem a sala 1937'an li Bendîxana Navendî ya Bexdayê de hatin idam kirin û mirina wan hindurî herkesi hejand û têlên xam yên şairan coland. Kesek nîne ku Xwede jê razî be, Mehmud Cewdet naskiribe û behsa azayetî, dilpakî, destvekirî û dilpiçûktîya wî neke.

Mehmud Cewdet, tenê efserekî (zabitek) jêhatî, alîkarvanek dilsoz ê Şêx Mehmud, dostek nêzîk ê Simko û muhacirê deste Majör Soanne nebû, eynî wextî ew yek ji wan bûye ku bi nivîsandin jî xizmeta gelê xwe kirîye. Di pê xwe de çend gotar û du kitêbên mezin hiştîye, ya yekem berhemê CA.Selmenti yê Rojavayî ye, derbarê Babî û Behayî de ye ku kirîye kurdî û bi navê "Behaullah û Dewra Nû" di sala

1933'an li Bexdad belav kirîye û 336 rûpel e. Ya duyem jî ev kitaba han e ku Hezîranê sala 1936'an bi navê "Polonya-Polende ya Lehistan" e* ' ku wî nivîsandîye, lê gelek mixabin firset neketiye destê wî bi xwe da ku belav bike. Sala 1940'an de, yanî sê sal pişti mirina wî, di Çapxana El-Me'arîf a Bexdadê li gel xerîteyek sîyasî ya Polonya çap bû. Ev kitêb 237 rûpel e, hecma wê biçûk e (12x17 cm.).

Di ve kitêbê de ku bi pişteyanîya sê kitêbên tirkî, serokanîyek frensî û yeka erebî nivîsandîye, Mehmud Cewdet behsa gelek milên jiyana aborî, civakî, sîyasî û çarenivîsa dîroka Polonya dike. Ev behsa dawîyê, gelek dîqqeta nivîskarî kaşa ye, wisa dbcuyê wek Kurdek birînên wî kola ye û nava wî şewitandî ye. Di kitaba Lehistan de ji her tiştî zêdetir hest xwe ragirtin, "jîyanhezî" û serî netewandina Polonîyên azadîxwaz dike, ew ên ku di dirêjahîya qonaxên se¬dan salan dîroka de bi destê ezîyeta Avusturya (Nemse) û bi taybetî Rusya û Prusya de bûn.

Xwede jê razî be, wî behsa Lehistan bi kurdîyek rewan

*û) Navê kitabe bi vî awayî çapkirîye.

hûnandîye û bi awakî zanistî çêkirî ye û hewil daye ku di vê rîyê re gotinên nû ji bo kurdî çêke yan wergerîne. Mesela "awrêj" ku tê mana "mesb el-nehir", "liman" yanî "el-minaî", "qral" û "qralîçe" yanî "el-melik" û "el-melike" û "an" yanî "el-sanîye" û "pîştan" yanî "el'êcyal" bikar anîye.

Şerê Cîhane yê Duyem û dagirkirina Polonya ji alîyê Nazîyan ve, ji bo belavkirina Lehistan firset zanîye ku pênc beşên pêşîn û heta rûpela 210'an nivîsandina wî bi xwe ye.

Herçî beşê sayem a kitêbê ye (rûpel: 211-237), behsa wan serpêhatiyên Polonya dike ku pişti wefata Mehmud Cewdet qewimîne, lê gelek mixabin qet tu cîyek kitêbê de behsa nivîskarê vê beşê han nehatîye kirin. An ne hevalên wî yên nivîskar evan milên "Lehîstanê" ji bo wî ronî dikirin.

Pençem : DÎROKA KÖYE

Min destpêka beşa "Kurtîya Bibliyografya Dîroknivîsa Kurdî" ya kitaba "Mêjû" de gotiye :

"Ev bibliyografya han tene gavek destpekî ye, qet dûr nîne kêmasîyan zede tê de hebiru. û ez rastî gotaran bi qîmet nehatibim yan destê min negihîştibe wan". Vêca bi zimanê "babe mezin e dîroknivîsa Kurdî Şerefxanê Bediîsi" ve ji "zanayên mirovî, dilpak û hêja" bi hêvi rica ye ku "gelek bi kûrî ser nivîsandinen min bisekinin û ger tiştek ber çavên wan bikeve bi awakî merdane muqayese bikin, ji xwe ger şaşitî yan jî bîrçûnek min tê de bibinin bê ku ser henekan bikin, li gel min hevaltîyê bikin û em bi perçek nûtir û baştir pîne bikin"*12) .

Mamoste, hevrê û biraya min ê yekcarî xoşewîst Mes'ud Mi¬hemmed, yekem kes bû bi vî hestî diqeta min kişand ku di bibliyografya "Mêjû" de "Mêjûyî Köye ya Koyîsencaq" a Ma¬moste Tayer Ehmed Hewezîm bibîr anîye. Her we rojê jî di nav dîyarîyên bi qîmet ên Dr.lbrahîm Hilmî de ev kitaba han ket

*12> Binêre: rûpela 258-260'e "Mejû".

berçavê min.

"Mêjûyî Köye", sala 1962'an li Bexdad hatîye çapkirin*) , wê sala min li derveyî welat dixwend, ji ber vê ev kiteb neket destê min û birayên wek min*) ku wî çaxî li ser dîroka Kurdî

xebat dikirin. Gelek milên ku li ser hatine sekinandin, bibûna serokanîyên ronîkirina wan behsên ku em di têzên xwe de li ser sekinîne. Gelek mixabin piştî vegerîna xwe jî li tu cî "Mêjûyî Köye" ber çavên min neket, wiha nebûya helbet ev valatî nediket "Mêjû" jî.

Lê li gel vê de jî hewce ye ez vê yeka han îtiraf bikim ku ev gotinên min ji bo wê yekê nîne ku ez xwe pê biparêz im, qet nebe ji ber ku Mamoste Neriman di rûpela 133'ê "Bibliyografya Kitêbên Kurdî" de bi awakî vekirî behsa "Mêjûyî Köye" kirîye. Her çawan be, dilê min dbcwest gelek berhemên din ên wek "Mêjûyî Köye" hebûna û vêca bila min jibîr bikirana!

Şeşem : GOTINA DAWÎ

Dîyarîyên bi qîmet ên Dr.Ibrahim Hilmî Fettah ji bo "Mêjû" gelek ji van jî zêdetir in ku me çend nimunên wan di vê gotara de xist ber çav, ez hêvîdar im ku bikarim istifade jê bikim û ez ji Mama Birahîm re hêvîya temenek dirêj û tenduristiyê di¬kim.

*") Tahir Ehmed Hewezî, Mêjûyî Köye ya Koyîsencaq, cilda ye¬kem, Bexdad, 1962, 159 rûpel, ji bo derketina ve gotare, kak Tayer namek sipehî ji min re şand, ku niha wek xelatek nazdar a "Mejû" min hildaye. Daxwaza min, Xwedê hez bike, li gel çapa duyem a "Mêjû" de çap bikim.

(14) Mebesta min Dr.Kawis Qeftan û Dr.Ehmed Osman in.

215

MÎJARA ÇARDEHAN

FATME MIHYEDDÎN :

PERIYA PEŞENG Û ESKERA BE NAV

Di salan xwe yên zaroktiyê ve, me ewqas navê perî û

perîzadan sehkirîye ku heryek ji me wênên xweşik di mêjîyê xwe de ji bo perîyan kaşa ye. Perîya rehmetî li ba herkesi jinek nerma giran a rehsivik û porspî bû. Ew kesê ku dixwaze di jîna xwe de perîyek bi çavên xwe bibîne dikare biçe li ba Fatme Mihyeddîn ku gelek mbcabin ne tenê serbaz, belko eskerek bê nav a Kurd e.

Temenê wê ji 80 salan derbaz bûye(*) , lê li gor ser çav û axaftina wê ji 80'yan kêmtir e. Mirov qet li cem (li balê) aciz nabe, xurcek (heybek) tijî serpêhatîyên mirarî û cewherên ronî ye. Cewher û mirarîyên sade û bêemsal, bi xwîdana pîroz a nav çavan û dilsozîya nav kûrîya gîyanê, bêxewîya şevan, jana jîyana Kurd a avzêrkirî ye.

Dor û berê sedsalek bere niha, Fatme, di bajarek wek Bexdayê de çav berdaye rîya dibistana "Ittihad û Teraqî"yê. Dûr nîne li vir yeka bi sera xwe ya ji bajarê Silêmanîyê be. Şer sekini û gelek derbaz nebû text û taca Dewleta Osmanî têk çû, Fatme ya xamekeç li gel baba xwe ku heta wî çaxî karbidestê Dezga Rejî(l) ya titunê bû, vegerîya welat.

Gelek bi zû pere dilê Ehmed Begê Fettan Beg e şair, bi tîra eşqa Fatma şox û şeng lêxist. Fatme ku bi xwe jî hez ji şiîr dikir(2) ket nav şairan û bû mêvanê dîwanxana Kurdperwe-

(*) Ev gotara han di rûpelên 15-18'yen "Rewşenbîrî Nwe" hejmara 73'an a Adara sala 1973'an de hatîye belav kirin.

(1) Di sedsala 19'an de Kompanya "Reji" ya Frensî berhem û firotina titûna Imparatorîya Osmanî bi tevayî girtibû dest. "Rejî" wek dezgeyek, ji serî heta binî nav Dewleta Osmanî de bibû navek belav.

(2) Di ciwantîya xwe de bi Tirkî şiir gotîye.

ran.
Gelek ser de neçû Şêx Mehmudê nemir rûpelek gelek hêja ya xebata gelê Kurd weşand û navçek girîng a welat ji zulm û zordestîya Îngilîzên dagirker rizgar kir. Ehmed Begê Fetah Beg, bû Wezîrê Darayî ya Şêx. Jinek wek Fatme ku jina wezîr jî bû, li gor urf û adetên civakê ya wî çaxî nedibû ku agahdarîya hemû tiştên be. Lê pist re wan jibîr kirin, piranîya xelkê dilxweş û aşiqê sencwebûnî û nemana xerabîyên Majör Soane û mirovên wî bûn. Qet kesekî Ehmed Begê bi vî awayî bi gurc û aza nedibû, ji bo mizgefta jî buya wiha nedikir. Ji ber ku dilê wî ber Şex Mehmud êşa bû, lê ji bo Kurd û xizmeta pîşewa qet tiştek dil de nema û xwe ji bo karkirinê amade kir. Zû bi zû şîkayetên ji destê Ingilîzan û planên wan hatin xuyakirin, xwezî Ingiliz ji halê Kurdan tegehiştana û henek û qeşmerîyan bi wan nekirana. Destpekî de dijî wan rikoyî nebûn, hêvîyek wan a mezin ji bo alîkarîya hebû!
Hemû serwet û hebûnên dezgên Şex di nav kasa jina Wezîrê Darayî de bûn. Bi bacan titun û gişt hatinên din ve ancex digihîşt 60 hezar rûpîyan ku dike 5-6 hezar dînarê îro!(3) , le çi heye yên wisa jî hebûn wijdana xwe dixistin bin pîyê xwe û serweta Heme Qedrî bi çend rupîyekê karbidestê biçûk ê Kurd dipîvan. Ev serveta han jî ku bibû sitrîyên çava çavbirçîyan bi sebebê dilpakî û sadetiya Fatme ve li gel hemû nivîna helal a Ehmed Beg, wek hêka paqijkirî ket destê Ingilîzan. Dema ku êrîşa be wext anîn ser bajêr firset bi wê ket tenê 3 lîrên xwe bibe û kasa girt û bi hêvîya ku gelek ser de naçe vegerin, wek xwe di cî de hişt.. Mixabin wiha derneket. Bi mehan vî gundî û wî gundî gerîyan. Her gelek sehkirin, ev hebe tunebe heywanek

wek rovî û çetên zarokên bêkesen xwe talan kirine.
Dema ku vegerîya bajêr bi naçarî demek baş jîyana xwe bi ziktêrîya rojane bir serî...
Perdek din a jîyana Fatme ku heta mirina pê îftixar dike, eva han e: yekem jina Kurdan lraqê ye ku bûye mamoste û tam 35 salen jîyana xwe bi wê perrê dilsozîya xwe ve bi sedan (3) 100 hezar rûpî dikir 7 448 pawenê sterlin.
217
keçên Kurd perwerde kirîye. Wek savayen ber sînga xwe li wan nerîye. Di destê wê de buya hemû keçên Kurdan hinê xwendin û nivîsandine dibûn. Ev perda jiyana wê gelek serpehatîyen ecêb û tijîmana ne. Ez wisa dizanim her rûpelek we, hêjayî weşane ne(4) .
Niha jî li ba we wisa ye, ew roj e ku Xwedê jê razî be Şêx Nuriye Şex Salih ê şair û xizmê wê, ket hindûr û ji hemû caran germtir pê re ket axaftinê. Qet bi vî awayî nehatibû dîtin. Ji rewşa wî ve dixuya ku ji bo kar û armancek girîng hatîye. Ket behsa xwendin û xwendewarî û methê Fatme ku yeka dinyadîti ye û dikare rê nîşanî kesên din bide. Gelek jî meth û senaya Ehmed Begê Tewfîq Beg kir û got ku gelek hez bi pêşkevtina Kurdan dike.. Piştî vê Şêx ê şair dûr û dirêj bi gotin û lefzek şêrîn ji xwîşka Fatme re dixwîne û têt ser armanca hatina xwe:
"Ehmed Beg dixwaze dibistanek a keçan li Silêmanîyê veke û ji xeynê Gûzide Xanim a jina Ebdulezîz Yamulkî û te pê ve kesek nîne ji bo vî kari. Tevizînek di Iaşe min de hat û ketim derya xeyalan... Rast e rwendin tiştek baş e û babe min ve yeka han gelek caran di guhe me de dixwend û min bi xwe jî ji

xêr û başîyê pê ve tiştek ji xwendinê nedîtîye. Lê dê xelkê bajêr ji me re çi beje?. Min çiqas rastiyê dikoşa, nedikarî qerare razîbûnê bidim. Lê wî mil danenî, ket handana min, dizanî ku ez yeka xwedêperest im ji ber vê jî gelek zede ayet û hedîsan tekele nav axaftinen xwe dikir. Cennete bi hûrîyan ve ji min re
(4) Weşandina bîranînen pêşrewên dîroka Kurd û jîyana rewşenbîrên me, wezîfek mezin e ketîye ser milên xwedî penûsen dilsoz en gelen me. Ev bîranînen han serokanîyên heja yên îro û rojên me yen be nin. Gelek ji wan p kîsê me çûne û kem ji wan mane. Heta niha çend carek min behsa ve mijarê kirîye. Bi qasî quweta xwe çi firset di vî warî de ketîye destê min, min jê istifade kirîye. Wextê xwe de min bîranînên - Xwedê jê razî be- Mamoste ismail Heqqî Şaweys berhev kirin, ew çû bîranên wî man baqî. Min beşek ji bîranînen mamoste Fuad Mestî û Ehmed Xwaca jî nivîsand. Hevîdar im bi dile we bin û bibin hander da ku yên mayîn ji kîs necin.
218
dikir teminat Hêdî hêdî ez nerm bûm û min beleni da. Bi vî awayî, qasê ku bibîra min de maye, sala 1926'an yekemin deriyê dibistana keçan li Silêmanîyê hat vekirin. Ehmed Beg ji bo navê min navê dibistana danî "El-Zehra"(5) ku di nav xelkê de "Zehra" jê re digotin. Cîyê we nêzîkî Mizgefta Mezin bû, niha jî dibistana Gulale ya keçan tê de ye".
Guzîde Xanim mudîra û Fatme jî tik û tene mamoste "Zehra"yê bûn. Herduyan berpirsîyarîya wê erkê girtin ser milên xwe ku li gel erkên îro gelek cûda bûn.. Çiqas navê Guzîde Yamulkî derbaz dibû, çaven wê tejî rondik dibûn: "Guzîde, Kurda Tirkîyê û jinek kamil û têgihişti bû, demek dirêj li Stenbol jîya bû, gelek bi germi xizmet dikir û vê yeka

han jî min gelek han dida. Bi rastî ew nebûya min dikir ez hişe xwe winda bikim. Ji ber ku her zû deva xelkê yen paşdemayî li me vebûn, hezar û yek gotinên ji me re digotin. Ve yeka han kiribûn eyb ku dema keç diketin hindûr 'eba û peçên xwe derdixistin!. Me gotinên ji van xirabtir jî sehkirin. Gelek dayîkan bi tirs û lerz keçen xwe dianîn û her ev yeka han tene dima ku em ji wan re kirasê Qur'anê li xwe kin da ku dilnîya bin em e agahdarî şerefa wan bikin ku bi xwendin lekedar nebin. Dayîken wisa hebûn pirsên wisa dikirin ku mirov nikare bêje".

Dayîkên dilsoz ên Kurd xwe dane ber pelên rojên borî yên ecêb, lê bi xwe jî :

"Sinifa yekem a dibistana me ya sava, yekcar ecêb bû. Yên wisa tê de hebûn ku temenê wan 20 û bawer bike ji 25'an jî derbaz dibûn. Bi serpêçen xwar, kilawên xweşik û bi soravkirî dihatin. Li gel ên wisa rûdiniştin ku keçen wan dihatin hesêbê. Lê hemû ji bo hînbûne dihatin, bi dil xwe helak diki¬rin. Feqîr û dewlemend bi hev re bûn. Niha jî di bira min de ye, min porteqal ji xwendevanan re birin, ên wisa hebûn nedizanîn porteqal çî ye, bihîn dikirin û pê diliştin. Heta min bi destê xwe ji wan re paqij kir û min wan têgîhand ku fêkî ye û tê xwarin".

Hestê veşarti ya xwendewarîye, zêdetir cote mamostan Zehrayê dicoland. Hez dikirin û hewil didan tiştek wan ji

(5) Ji "Fatimetu'l Zehra" te.

yên kurran û mêran kêmtir nebe. Vir de dayîka Kurd taqet daye ber xwe û germtir bûye, wisa dikir dixwest ku xwe îspat

bike, vêca nizanim hestê wê dikir ku em bi hemû hişî xwe ve bikevin perestgahîya dilsozî û fedakarîyek ji bo perîyek ji xelkê xwe re yan na? Eva han girîng nîne, mimkun e wiha nebe, lê bira ji ber dilê wê ya nazik ez jî hewil didim xwe û xwe hîşyartir nîşan bidim:

"Her ewqas me bihîst ku Fuad Reşîdê mamostê kurran şanogerîyek a "Neronê Zordar" pêşkêş kirîye û bi vî kara han hestê gelek kesan bizwandîye. Li ser vê em jî ketin saha û me xwest gavek hîn baştir bavêjin. Em tev li ser bîr û rayek bûn da ku behsa meselek wisa ya nav civakê xwe bikin ku hemû rojan em tûşî qurbanên wê dihatin. Lê kesek ji me nivîskar nebû, ji ber vê me pena bir ba Şêx Nurî û ewî jî li ser pêşnîyara me şanogerîya "Dayîk" ji me re amade kir. Me dibistan da girtin û perdên xwe vekilin. Nêzîkî heftîyek jinên bajêr bere xwe dana û bi meraq li "Dayîk" nihêrtin. Behîca, xwîçka min rola Dayîk û Şefîqa Seîd(6) ku xwendevanek hîşyar a dibistana me bû, rola doktor dilîst. Aşkera bû li têla dilê nezanîyê dixistin". Heta îro jî çi bi xwe çi xwîşka wê, naveroka "Dayîk" jibîr nekiribûn ku beşek wê bi şiîr hatibû nivîsandin.

"Dayîka nexwenda bi xeleti dermanek etaran zorî bi zarokê xwe dide xwarin, derman tesîrek xirab li zarokê dike. Li ser vê hawar, qêrîn û girin ji dayîkên reben ên taxê (gerê) diçe û tên nêrînê. Yek ji wan porspîya zîrek a cîrane wan bi kelebez dikeve hindûr û dipirse:

Çî ye em griye û zarîye
Bo çite hawar û telaşy?
(Çî ye ev girin û zarîn
Bo çî ye hawar û telaş?)

Dayîk bi awakî şerpezetî:
Her gîz xewî nebû minîş
(6) Behîce Mihyeddîn û Seîde Şefîqe, du peşrewen din ên meydana xwendevarîya jinên Kurd in. Sedan keçên Kurd li ber desten wan û grubek xwîşkên wan de hîne xwendin û nivîsandina bûn ku piranîya wan derecen bilind en xwendinê temam kirine.
220
Çum dama tozêk şileyi xaşxaş
(Bi tu awayî xewa wî/wê nedihat û min jî
Daya hinek şemaya xaşxaşê)
Cîranê wan dema vê seh dike bi lez diçe pê doktora bajêr.
Doktor bi eynî awayî dipirse:
Çî ye em griye û zarîye
Bo çite hawar û telaşy?
(Çî ye ev girin û zarîn
Bo çî ye hawar û telaş?)
Daya :
Her giz xewî nebû minîş
Çum dama tozêk şileyi xaşxaş
(Bi tu awayî xwewa wî/wê nedihat û min jî
Daya hinek şemaya xaşxaşê)
Doktor :
Ca
Kê be toyî wot dewayekî zerîf û baş e
Tulû wa qabîl dermanî wek xaşxaş e?
Xra ke em dermaneyî biderê
Belku be carek çareyi bikrê
Itir her giz lew dewayaneyî nedeyte

(Vêca
Kî ji te re got dermanek zerîf û baş e
Tifalên wiha qabilê dermana wek xaşxaş e?
Zû rabe vê dermana bidê
Belko bi carek kêr bê
Edî carek din ji van dermanan nedê)
Dayîk :
Tobe bê, tobe bê ya Rebî
Heta mawm dermanî wayî nedeme"
(Tobe be, tobe be ya Rebbî
221
Heta hebim dermanek wiha nedimê".)
Ger wijdana me hebe û em bi hemû milan de, li meselê binêrin, hewce ye em vê yeka han îtîraf bikin ku yekemin di şanogerîyê de jinên me ji mêrên me birine (7) .. Mamostê yekem di vê gotina xwe de bixeq bû. Min nexwest ez zade wê aciz bikim, hat ser bersîva min a duyem :
"Guzîde Yamulkî sê sal berpirsîyarî kir ku ew çû Bexdayê Zehraxan a keça Mistefa Yamulkî dor û berê sê salan cîyê wê girt û dawîyê nêzîkî 30 salan kar û baran dibistana ketin ser milên min. Rewşenbîrên wî çaxî yên bajêr piştgirîya me diki¬rin. Carek nêzîkî ber Derîyê Serayî yekî ji hêdîka ve destê xwe li pişta min xist û ji min re got 'aferin, hezar car aferin, we sera me bilind kirîye..' dema ez vegerîyam, min lê nêrî, Pîremêrdê Şair e. Pîremêrd, gelek tiştên din gotin, dixwest ku hemû malek bike dibistan û dar di dest de bikeve gîyana wan dayîk û baban ku zarokên xwe nadanin ber xwendinê...".
Axaftina dawî ya mamosta me ya yekem:

"Niha jî, her çend çaven min jar in, guhên min giran û bira min kêm bûye, lê car û caran dibinim ku keda min vala neçû ye û keç ketin rêzên birayên xwe û mil bi milên wan jîyana nû ji bo nevîyên xwe yên ben vedihûnin".

Serbaz û eskerên me yên wek Fatme gelek in, qet nebe bira em car û baran wan bibîr bînin, ku wextê wê bê em heykelên wan ên gelek bi şanazî (îftbcar) di nava dilê xwe de daçikînin û tiştên ku nayên zanîn ji wan hînbin da ku ji kîsên me necin.

7) Rewşenbîrên Kûrden Tirkîye ji ber çend sebebên taybetî û gelemperî ve, bere me derîyê gelek huneran xistine. Bere Şerê Cihana yê Yekem ewan şanogerîyê bi Kurdî danîne. Li gel ve jî jinên Kûrden lraqê di vê saha de yekemin in.

222

MÎJARA PANZDEHAN

MATENEDARAN AN CEWHEREK JI

CEWHERA ROJHILAT

ErmenîC) yek ji gelên herî kevnare yên ser zemîna cîhana ne(l) . Berê Isa, Ermenî xwedî jîyanek pêşkevtî bûn. Welatê wan Ermenîstan yek ji wan welatên e ku bi bermayên dîroka kevin ve gelek dewlemend e, heta niha gelek bermayên kevin tê de hatine dîtin.

Ermenî, wek gelên din ên Rojhilata di destpêkî de tiştê ku dixwestin, ser kevirên qeraxên çîyan bi kolandinê dinivîsandin. Beşek ji van nivîsînen kevin hatine dîtin û naveroka wan hatine zanîn. Lê du sebebên nû her ji kevin de tesîrê kirîye ser pêşdeçûna nivîsandin bi zimanê Ermenîyan. Ya yekem, belavbûna dînê Mesîhî bû ku di destpêka sedsala 4'an ve dînê resmî yê Ermenîyan ne, ya duyem û girîngtirîn jî di xelasîya

sedsala 4'an de danîna alfaba taybetî ya zimanê Ermenî bû(2)
(*) Ev gotara han di rûpelên 7-10'en kovara Beyan, hejmar: 30, Teşrîna Yekem a sala 1975'an de hatîye belav kirin.
(1) Beşe zade ye zanyarîyen ve gotare, ji alîye nivîskar bi xwe ve li Matenederan de hatîye berhev kirin. Beşên din jî ji hinek sero¬ kanîyên din hatine girtin, bi taybetî ji kiteba; G.W. Abgar, The Matenadaran,
Erevan, 1962.
(2) Misorp Maştots alfaba Ermenîyan danî. Ev alfaba han heta niha jî di nav Ermenîyan de gelek belav e û hemû sal, bi taybetî li Ermenîstana Sovyetê bi sedan kitêb, rojname û kovar pe ten weşandin. Misorp Maştots yek ji wan mirovên mezin en Ermenîyan e ku bi heq îftîxare pe dikin.
223
Di zemanê kevin ve lawen hîşyar ên Ermenîyan xwedî dîroka tijî bûyer û karesatên kevin, Ermenîyan xwedî edeba esîl, Ermenîyan xwedî fêrgehên ayînîyên cur bi cur û dêrên mezin û biçûk, ketine weşandina hemû milên jîyana rewşenbîrî ya bab û bapîrên xwe û ji bilî van, ser dema xwe de zanayên Ermenîstane di destpêka sedsalên Navîn ve ketine wergeran¬ dina berhemên felsefî û zanistî yên gelên din ser zimanê xwe ye zikmakî. Bi vî awayî demek gelek dirêj ve bi nivîsandin û belavbûn helgirtin û parastina destnivîsên di nav Ermenîyan de bûye karek zanistî-edebî yê rewac û layîq. Beşê herî zade yê van destnivîsên li kitêbxanên xwendegeh û daran de hatine parastin. Mezintirîn ciyê parastina van destnivîsên han bi navê Matênederan e ku di sedsala 5'an, li Eçmadzîn a nêzîkî Erîvanê hatîye damezrandin. Bi vî awayî xezîneke bi

cewherên gelek dewlemend li Ermenîstanê de durust bû ku niha yek ji serokanîyên hêja yên herî girîng ên dîroka kevin û navîn a gelan têt hesêb kirin û her ji ber vê jî bûye xezîneke bi qîmet ji kesen îro re. Wek mîsal gelek destnivîsên kevin ên wisa tê de hene ku wextê xwe de bi zimanên din hatine nivîsandin, lê niha tene wergera wan a Ermenî mane û esil û wergerên wan ên ser zimanên din ji sebebên aşkera têkçûne. Di vî warî de zerarên Ermenîyan kêm nebûne. Tenê dagirkerên Selçukîyên di sala 1170- an de, zêdetirî deh hezar destnivîsên Ermenîyan îmha kirin. Di wextê qetlîama Ermenîyan a dema Osmanîyan de (salan 1894-1896, 1909-1915X3) hejmarek gelek zade destnivîsên Ermenîyan ên hêja bûn qurbana hestê korane ye grubek karbidestên kurtbîn ku bi vî awayî zerarek mezin gîhandin xezîna rewşenbîrî ya mirovatiyê . Lê ji bo ku qîmeta fikir û jîyana li ba Ermenîyan wek hev bû, karîn ji ber sebebê vê bîr û bawerîya han a mezin û zîrekîya xwa ya be mîsal û dilsozîya xwe ya bê sinor, bi bihayê zêran beşek zade ji cewherên vê xezînê rizgar bikin. Li vir ez ê tenê nimûneyek pir manedar di vî warî de bidim:

(3) Nivîskarê vê gotare, hinek beşên kiteba "Kurdistan di Salen Şerê Cîhane yê Yekem de" ji bo vê meselê amade kirîye. Her wiha binêre: Kovarî Korrî Zanyarî Kurd, hejmar 3, cild 2, rûpel: 75-157.

224

Ermenî, di sala 1170'an şûn de bi dilsozî ketin pê wan cure destnivîsên xwe yên ku Selçukîyên têk birin yan zeft kirin. Di sala 1205'an de karîn bi çar hezar dîrheman ku ji bo wê serdema perek yekcar zade bû, yek ji wan destnivîsên xwe yên bi qîmet ji Selçukîyên bikirin ku heta niha jî maye, bi herim û

giranîya xwe ve mezintirîn destnivîsa Ermenîyan tê hesêb kirin. Di wextê qetlîama sala 1915'an de jî du pîrejinên Ermenîyan karine wê destnivîsa rizgar bikin. Her yek ji wan beşek wê girtine ser xwe û ber bi Ermenîstana Bakur a ser Rusyayê bi rîyên cûda de ketine rê. Yek ji wan gihîştîye cîyê xwe, ya din jî jiber ta, nexweşî û birçîbûnê di rê de mirî ye, lê berê ku bimre vê perçê di çalek de veşartiye. Qasek şûn de gerokek Awrupî li wan deran bi tesadûfi çend rûpelên wê dest¬ nivîsa di destê zarokên wê navçê de dibîne, bi çend lib şekiran deva wan sêrin dike û wî dibin ser çala. Dema ew mirovê gerok digihîje Ermenîstana Rojhilat, xelkê wir bi vê bûyerê dihesin û hewil didin carek nû de vê perçê bikrin û naçar dibin navbera xwe de 400 hezar pawen berhev dikin.

Bi vî awayî bi hezar belayî sera wan de hati ve, Ermenîyan karine wan hebûnên xwe yên mezin biparêzin. Piştî wê ku Ermenîstana Rojhilat di sala 1828'an şûn de bû beşek ji Rusya Awrupayî gawur ayînî firseta parastina destnivîsên Ermenîyan ji carên din gelek zêdetir bû, her çendîn li wir jî beşek kêm ji wan destnivîsên birin dezgên zanyarî yên Mosko¬ va û Petrogradê.

Li gel damezrandina Komara Ermenîstana Sovyetê, qonaxek din a nû di berhevkirin, parastin û lêkolîna destnivîsên kevin ên Ermenîyan de destpê kir. Ji Kanuna Yekem a sala 1920'an şûn de Matênederan kirin dezgehek dewleti. Demek kurt piştî vê, ew 4660 destnivîsên ku di sala 1915'an de biribûn Moskova, paşde anîn li Matênederan. Ji sala 1939'an ve cîyê wê jî guherandin bajarê Erîvanê ya paytext. Di sala 1959'an şûn de Matênederan ji bo lêkolîn û parastina destnivîsên kevin bûye

enstituyek serbixwe. Koşka xweşik a Matênederan(4) îro li ser
(4) Ev koşka han ser awaye avayîsazîya Ermenîyan a kevin hatîye çekirin û ji bo pêwîstîya parastina destnivîsên hemû malzeme te de ne.
225
cîyek bilind, li bajarê Erîvanê dinêre û cewherên bi qîmet ên ku tê de ne her yek bi awayek serpêhatîyên gelek hêja û zanistî ji bo nevîyên xwe yên îro û rojên bên diparêze.
Hejmara destnivîs û perçe destnivîsên Matênederan ji 15 000 zêdetir e (berê Şerê Cîhana yê Yekem ji 5 000 kêmtir bû), dor û berê 13 000 ji van bi ziman û alfaba ermenî ne, yên din bi yunanî, erebî, farisî, tirkî, hindî, rusî, hebeşî û zimanên din in. Kevintirîn perçedestnivîsên Matênederan ên sedsalên 5, 6 û 7'an in. Yek ji van destnivîsên Incîlek e ku di sala 887'an de hatiya nivîsîn. Mezintirîn destnivîsa Matênederan 32-34 kîlo û 609 rûpel e, sala 1201'an hatîye nivîsîn û ji rêzek gotaran dêrê, nivîsên dîrokî û felsefî pêk tê. Nivîsînên vê destnivîsa, nêzîkî pêwistîya 700 postan golikan bûye. Giranîya biçûktirîn destnivîsa, tenê 14 gram û 104 rûpel e û salnamek a kilîsê ye. Ev destnivîsa han a hêja di sala I436'an de li ser posta karik ên nazik (hîn ji dayîk nebûyî) hatîye nivîsandin.
Bi nincandin pesnê destnivîsên Matênederan nayên dayîn. Bere hemû tiştek di saya van destnivîsên de beşên rûpelên mezin û girîng ên dîrok, edeb û jîyana civakî ya gelê Ermenî ya qonaxên cûda cûda hatine parastine û di rîya van re tên zanîn. Ji derveyî van, ev destnivîsên han tijî ji zanyarîyên bi qîmet ên derbarê jîyan û dîroka gelên Rojhilata Navîn in, bi taybetî ew ên ku bi Ermenîyan re cîran in, gelek ji wan jî di derbarê

navçan Qefqasê, Irana Sefewî, Imparatorîya Bîzansî, dewletên Ereb en Islamî û şer û êrîşên Xaçperestan, Moxol, Teter, Selçukî, Tirk û gelek ên din in.

Beşê herî girîng ê destnivîsên Matênederan ji bo behsa dîrok hatine amade kirin. Dîroknivîsên bi nav û deng ên Ermenî gelek nivîsên bi qîmet di pey xwe de hîştine ku evên han bi destnivîsên herî hêja yên naskirî yên cihana re tên muqayese kirin. Wek nimûne: yek ji wan dîroknivîsa sedsala 5'an destnivîseka xwe ji bo behsa belavbûna dînê Mesîhî li Ermenîstana de amade kirîye. Destnivîsa "Dîroka Xelîfan" behsa wan serpêhatîyên dike ku di dema fermanrewatîya Ereban a di navbera salan 632 û 1788'an de qewimî ne. Her di Matênederan bi xwe de jî dor û berê 600 destnivîs hene ku bi alfaba erebî, bi zimanê erebî, farisî, tirkî û yên din hatine

nivîsandin. Navê Ibnî Sina, Şehabeddînê Şîrazî, Fîrdewsî, Hafiz, Se'dî, Nizamî û gelek navdarên din ên Rojhilat di gelek destnivîsên vê dezgê de dikevin berçav.

Hejmarek zade wêne û nîgarên rengareng ên kevin di Matênederan de hatine parastin, hinek ji wan di sedsala 5'an de hatine çêkirin û hemû belge û nîşanên hestê hunerîya bilind a Ermenîyan in. Ew rengên ku ji bo çêkirina van nîgaran bikar anîne, bi sedan sal in wek xwe man e, dîyar e ev yeka han jî bi sera xwe di warê kîmyagerîyê de nişana pêşkevtinê ye.

Bi rastî behsa Matênederan, cewherên Matênederan, kitebxana Matênederan û bi sed hezaran belgên ku di Matênederan de hatine parastin, kara gotarek biçûk nîne(5) .

Gelê Kurd jî wek yek ji wan cîranên herî nêzîk û têkelî Ermenîyan, di Matênederan de beşa xwe heye. Di gelek dest¬ nivîsên kevin de navê gelên Zagrosê, Medîyan û Kurd bi xwe heye û behsa navçen Kurdewarî hatine kirin. Em qet dûr necin Mînorsky yê bi nav û deng di nivîsîn û lêkolînên xwe yen derbarê Medî û Kurdan de feyde ji kitêbên dîroknivîsa mezin ê Ermenî Movsîs Xorînatsî (Maysay Xorênskî) wergirtîye(6) ku wî di sedsala 5'an de nivîsandine û nivîsên wî di Matênederan de hatine parastin.

Ji derveyî vî milê girîng, birek destnivîs û perçedestnivîse taybetî ya li ser Kurdan, ya bi kurdî di Matênederan de hene. Tiştê ku ji bo me nû balkêş be ev e ku di birek destnivîsên Ermenîyan de çend rezen kurdî, bi alfaba Ermenî hatine nivîsandin. Yek ji van destnivîsên derbarê rêzimana Ermenî de ye û di sedsala 15'an de hatîye nivîsandin, lê çend duayên bi erebî, farisî û kurdî tê de ne. Her wiha Incîlek bidestnivîs

(5) Gelek tiştên Matênederan hêjayî gotina ne. Bi gelek dîqqet dest¬ nivîsên di germîyek taybetî de diparezin. Ji 120 kesan zêdetir li Matênederan kar dikin, ji van 20 kes doktora û 7'ê wan xwedî dokto¬ ra zanistî ne. Her sal hejmarek zede kitêb û gotaren zanistî yên bi qîmet ji alîyê Matênederan ve ten belav kirin.

(6) Di vî warî de binere: F.Minorsky, "El'Ekrad Ehfadu'l Medîyyîn", Kovarî Korrî Zanyarî Kurd, hejmar: 1, cild: 1, rûpel: 552-566.

227

bi zimanê Kurdî û tîpên Ermenî heye ku dûr nîne di sedsala 18'an de hatibe nivîsandin.

Ji derveyê van herduyan, hin destnivîsên gelek girîng ên derbarê Kurdan de di Matênederan de hatine parastin. A

yekem destnivîsa hejmara 1799'an a beşê erebî ye ku destnivîseke rêk û pêk a Şerefnamê Şerefxanê Bediîsi ye. Ev dest¬ nivîsa han di sedsala 18'an de li ser 412 rûpelên mezin û bi 21 rêz hatîye nivîsandin. Ez wisa dizanim ku ew kesên ku li ser Şerefnamê nivîsîne, heta îro behsa vê destnivîsa han a Matênederan nekirine.

Ya duyem, destnivîsa hejmara 612'an a beşê erebî ye ku destnivîsek girîng a hêja ye, kêm têt naskirin û li ser eşîra Dunbulîyan e(7) .

Ev destnivîsa han 253 rûpel e û pîvana rûpelên 15x25 santim e, di sala 1850'an (1260'ê koçî) li Tehran, di Medresa Mîrza Salih de ji alîyê Elî Ekberê Huseynê Tefreşî yê kûre Hacî Seyîd Ismail ve hatîye nivîsandin û ji sê beşan pêkhatîye : Navê beşê yekem Eşaretu'l Mezahib (Işaretên Mezheban-Elîşêr), a duyem Işaretu'l Edyan (Işaretên Dînan-Elîşêr) e û ev herduyan han nivîsên Rustem Xanê kura Ehmet Xanê Dunbulî ne û bi xete neste'lîq hatine nivîsîn. Beşê sayem di dawîyê rûpelên destnivîsa de ye û navê wê Tarîxa Denabîle (Tarîxa Dunbulîyan-Elîşêr) ye û ji alîyê Ebdurrezaqê kura Necef Qulîxane Dunbulî ve hatîye nevîsîn, ev beşê han temam nîne û bi xetê "nesx" hatîye nivîsandin.

Di beşe yekem û duyem de Rustem Xan behsa dîn û dîroka

(7) Cara yekem E.D. Papazyan, bi zimanê Ermenî û di bin navê "Serokanîyek Nû Derbarê Dîroka Gelê Kurd de" gotarek di derbarê vê dest¬ nivîsa de (di hejmara 8'an a sala 1967'an di Kovara Akademîya Zanyarî ya Ermenîstana de) belav kir.

Multedyên Ermenîyan di 1916'an de vê destnivîsa han li gel xwe

anîne û ev ketîye deste Prof.Aşot Efanisyan, wî jî wek dîyarî şandîye ji Matênederan re.

228

eşîra Dunbulîyan dike, her wiha behsa Şahên Irana yên berê Islama û Bermekîyan jî kirîye û Dunbulîyan bi nijad bi wan ve girêda ye. Wan behsên ku ji bo bûyerên dawîyê sedsala 18'an û destpêka sedsala 19'an amade kirîye, qîmetek wan a gelek hêja heye, bi taybetî ji ber ku, ew tiştên ku nivîskar behs dike, yan bi çavên xwe dîtîne yan tê de beşdar bûye. Li qerax û perawêzên vê destnivîsa Matênederan de Rustem Xan bi xetê xwe têbînî nivîsî ye û hinek cîyan rast kirîye û vê yeka han jî, bêguman, qîmeta destnivîsa zêdetir kirîye. Eva demek e rêvebirên Matênederan bîryarê belavkirina vê destnivîsa dane.

229

MÎJARA ŞANZDEHAN

KURD Û ÇIRÛSKEK DÛR A AGIRE

SERE DUYEM

Li gor naveroka xwe du cur şer hene: Şerên heq û şerên neheq (*) . Ya yekem ji bo serfirazî û azadîyê ye û ya duyem jî ji bo zulm, zorî û dagirkirinê ye. Lê çi ev û çi ew, di hêla zerar û zîyan de, di hêla rûndikên çavan û xwîn de yek in.

Şerê Cîhana yê Duyem ku nêzîkî şeş salan ajot (llon 1939-Gulan 1945) mezintirîn facîa ye ku heta niha însan û hemû cihan rast hatîye. Ger em van gotinên bixin çarçova reqeman bi vî awayî derdikeve:

72 dewlet têkelî vî serî bûn (di Şerê Cîhana yê Yekem 33 dewlet), 110 milyon kes bi çek tê de beşdar bûn (Şerê Cîhana

yê Yekem 74), 1384 milyar dolar tê de çû (Şerê Cihana yê Yekem 208), dor û berê 50 milyon însan tê de hat kuştin (Şerê Cihana yê Yekem 10), nêzîkî 28 milyon însan tê de seqet bûn (di Şerê Cîhae yê Yekem de 20).

Almanya ji ber sebebê mexlubbûnê û Yekîtiya Sovyet jî ji bo

(*) Ev gotara han di rûpela 1 û 17'yê kovara Beyan, hejmara 29'an, îlona 1975'an de hatîye belav kirin.

ku Hîtler heta sala dawî ya şerê, nêzîkî ji sedî 75'ê hazên xwe yên şerê biribû ser wan, di vî serî de ji hemû milan zêdetir tûşî zerar, zîyan û wêranîyan bûn. Sala dawîyê ya şerê jî, yanî piştî danîna cepha duyem ji alîyê Welatên Sondxwarî yên Rojava ve, hîn dor û berê ji sedî 67 hazên çekdar ên Almanya di cepha Sovyet de şer dikirin. Ew zerara ku li Yekîtiya Sovyet ket nîşanek bê mîsal û tik û tenê ya rûndikên çavan û xwîna şer e:

Ji ber sebebê Şerê Cîhane yê Duyem 1710 bajarên mezin û yên biçûk ên Sovyetê hatin kavil kirin û 70 hezar gund jî li gel ax û malan wan ve wêran bûn, bi vî awayî 25 milyon kes bê cî û war man. Di salan şerê de 32 hezar dezgên pîşesazîyên vî welatî û 65 milyon kilometre riyan hesin ji bînî de ji holê rabûn. Di hêla peran de Yekîtiya Sovyet 500 milyar dolar zerar kir, yanî ji sisîyan yekê zerarê hemû şerê hîn zêdetir. Nêzîkî nîvê kuştî û seqetên şer, ên Sovyet bûn.

Derd û belaya Şerê Cihana yê Duyem hemû quncikên cîhana girt, yên nehatin kuştin yan beşdarê şer nebûn, birçîtî, nebûn û nexweşîyê tam kirin.

Neteweyê Kurd ê hêja jî beşa xwe ji vî girt û hinek din hejar

bû. Rast e Kurdistan wek di Şerê Cîhana yê Yekem nebû yek ji wan melbendên şer, ji ber vê jî ji yên din kêmtir tûşî zerar, zîyan û mirina bû, lêbelê li gel vê jî, ew jî wek hemû gelên Ro¬jhilata Nêzîk û Navîn ji ber sebebê bûyer û hedîsên şer ve tûşî gelek derdan bû. Çirûskên Şerê Cîhana yê Duyem di gelek milan de, bi gelek awan tesîrê gelê Kurd jî kir. Ca li vir de em behsa meselek biçûk bikin, eva han behsa çirûskek wî serî ye ku nayê nehatî zanîn û ku bi hezaran kilometre ji me dûr, le tesîrê jîyana rewşenbîrîya me kirîye.

Ivan Yûgev, lawekî xwîngerm û exlaqbilind ê Sovyet bû. Di xwendinê de zîrek û di nav hevalên xwe û civatê de xoşewîst bû. Gelek zû, ji dûr ve derd, eziyet û çarenivîsa gelê Kurd bala vî lawê keşa û pişti temamkirina unîversîta dest bi hînbûna zimanê kurdî kir û bû xwendevanê doktora beşê dîroka û bi çalakî li ser Kurdan dest bi amadekirina nama doxtora xwe kir. Lê gelek mbcabin, gelek di ser de neçû agirê Şerê Cihana yê Duyem vêket û pişti demek kurt welatê wî jî girt...

231

Ivan Yûgev, wek piranîya zade ya lawên Sovyete, çek avêt milê xwe û li gel hevalên xwe ber bi şer de, ji bo parastina axa welat û şerefa gelê xwe ket rê...ber bi mirina de çû û venegerîya... bi hinek zimanê kurdî û bi gelek xoşewîstîya Kurdan ve serî danîû

Bêguman Ivan Yûgev bimaya îro dibû yek ji Kurdnasên Sovyete yên wek Xalfîn, Lazerêv ku bi aktifi xizmeta lêkolîna dîroka Kurd dikin... Ger şer bimre û aşîtî bijî, bi hezar û hezaran kesên wek Ivan Yûgev xweştir dê baxê jîyana vedin û elbet wî çaxî Kurd jî, çiqas dûr be jî, ji bîhna wî bêpar

nabinû.
232
ENDEKSA NAV Û CÎYAN(*)
NAV
A
Abgar, G.W. : 223(p).
Adilî Şex Selam : 138.
Adolf Hîtler : 93.
Binere : Schicklgruber, Adolf.
Afxanî : 41 (p).
"Agirbesa Mondrose" : 97.
Akademîya Orbelî : 121.
Akademîya V.A. Gordlevskî : 33(p), 34.
Akademîya Zanyarî ya Azerbeycana Sovyete : 20.
Akademîya Zanyarî ya Rusya : 22.
"Akademîya Zanyarî ya Kurd": 30, 51, 112.
Binere : Korrî Zanyarî Kurd.
Akademîya Zanyarî ya Sovyete : 32, 33.
Akopov, G.B. : 200(p), 201 (p).
Alman, Almanî : 25, 82,

203.
Amerîkî, Amerîkîyan : 82,
83, 84.
Areland, P.W. :140.
Ararat : 61.
Arnawudan : 67, 209 (Albanî).
Artakserkses : 13.
Asquith : 167.
Asurî : 189, 203.
Atatûrk : 60 (p).
Binere Mistefa Kemal.
Awhanisyan, N. Prof: 140
(*) Ew naven wek Kurd û Kurdistan ji ber ku gelek cîyan de derbaz dibin me dernexistin. Nav û cîyen di peraweza (noten binî) de derbaz dibin me li hemberê wan di nav kevane de tîpa "p" nivîsand.
233
(p).
Awrupî, Awrupîyan : 22,
25, 27, 35, 47, 79, 134, 158,
192(p), 225.
Azerî : 20(p), 28, 42.
B
Baba îshaq : 41, 42.
"Babu'l Mu'ezzem" : 181
(p).
Balese (kovar) : 7(p), ll(p).
Bangî Heq : 137.

Bangî Kurdistan : 129, 130,
131,137(rojname).
Banka Merkezî : 89(p).
Barbe, G.A. : 25.
Batas, Batasyan : 144.
Bazara Bazazan : 168.
Babî : 213.
Bedirxanî, Bedincanîyan :
59, 97, 112, 120(p), 121, 127.
Bedleys (Bed+Leys) :49.
Babî : 213.
Behayî : 213.
Behdînî, Behdînîyan :
159.
Behîca : 220.
Binere : Behîce Mihyeddîn.
"Behaullah û Dewra Nû"
:213.
Behîce Mihyeddîn : 22(p).
Bendîxana Navendî ya
Bexdaye : 213.
Benîto, Mussolînî : 94.
Berdeqareman : 136(p),
159.
Berkes, Nîyazî :66(p).
Bermekîyan : 229.
Beşa Kurdî Leqa
Lenîngrade : 20.

Bevin, Ernist : 188.
Beyandir : 51.
Beyan (kovar) : 223(p),
230(p).
Beyatî (eşîr) : 144,
Bexdûz : 135.
"Bibliyografya Derbarê
Mesela Kurd" : 19(p).
Bibliyografya J.S. Musael-
234
yan : 21 (p).
Binêre : Bibliyografya
Kurdnasîya.
Bibliyografya Kurdnasîya :
21(p).
"Bibliyografya Kitaben
Kurdî" : 215.
Bibliyografya Rojhilat (ko¬
var) : 43(p).
Bîll, Kapîten : 161.
Bili, X.: 161.
Bîll, Mîster : 101.
Binêre : Bîll, Kapîten.
Binemala Bebe : 114.
Binemala Celîzade : 116.
Binemala Mihemmed
Elîyê Mezin : 211.
Binemala Mutabçî : 199.

Birahîm Xan : 166.
Binêre : Birahîm Xanê Delo.
Birahîm Xane Delo : 101 (p),143.
"Birayetî" : 140, 171(p).
Bîzansî, Bîzansîyên : 36, 37,38(p).
Bonapart, Napolyon : 80.
Bond, Kapîten : 104.
Cadey Ber Sera: 111.
Caf, Cafan (eşîr) : 104, 143.
Cafer Eskerî: 96, 146, 173.
Cejna Çjurbanê : 206.
Celadet Bedincan : 125, 127(p).
Celal Baban : 142.
Celê (binemala Celê ya Koya): 114.
Celal Baban : 142.
Cemal Baban : 180, 182.
Cemal irfan : 135.
Cemal Xeznedar : 131(p).
Cemil Medfe'î :183.
Cemil Saîb :135.
Cem'îyetî Kurdistan : 129, 130.
"Cem'îyyetu'1-Ehd" : 159

(p).
Cengiz Xan : 161.
Chetraws : 153.
235
Charmoy, F.B, Prof. : 25,
26.
Chîrer, Wilyam : 93(p).
Churcill, W. : 101.
Civata Milletan : 112.
Binere : Koma Mille¬
tan.
Cîgerxwîn : 112.
Cuhî, Cuhîyan : 110, 156,
163, 169.
Curzon, Lord : 98.
Binêre : Curzon, Lord
Nathaniel.
Curzon, Lord Nathaniel :
98(p).
Çalak Talebanî : 119.
Çapxana Hukumeta : 131.
Çapxana El-Me'arif a Bexdayê
: 213.
"Çapxana Kurdistan a Mahabadê"
: 132.
Çar: 32.
Çînî : 80(p).
D

Dagobert : 204.
Dail Mil (rojname) : 153.
Danişmend,Danişmendan
: 37(p).
Dantisg, B.M. : 167(p).
Dautsîg, B.M., Prof. : 58(p).
"Dayî Cezayir" : 54.
"Dayîk" : 220.
Dawide (eşîr) : 166.
Delê Ebbas : 166.
"Deng û Behsên Rojhilata
Navîn (kovar) : 20(p).
"Derîyê Vekirî" : 83.
Derek : 48.
Derîyê Bilind: 114, 120,
121, 127.
Binêre : El-Bab el- Alî.
Derîyê Serayî : 222.
Detroît : 202(p).
"Derîyê Vekirî" : 83.
Dewleta Asurîyan : 14.
Dewleta Dostkîyan : 38.
Dewleta Medîyan : 15, 17.
Dewleta Osmanî : 114(p),
236
120,121,216.
Dewleta Selçukîyên : 37.
Deylamî : 41.

Dewletên Yekgirtî yên
Amerîkayê : 81, 82, 83, 85,
87,89(p),98(p).
Dezga Parastinî ya Belgên
Kevin: 154.
Dezga Reji : 216.
Dezga Rîya Hesin a
Ingilîzan : 204.
Dezga Rojhilatnasî ya Akademîya
Zanistî ya
Azerbeycan û Emenîstana
Sovyetê: 58.
Dêtawc : 166.
Dize, Dizeyan : 145.
Dîyarbekrê Welatê Kur¬
dan : 210.
Drasat Fî'l-Tarîx we'l-
Asar(kovar) : 169(p).
"Dîroka Xelîfan" : 226.
Dunbulî, Dunbulîyan :
229.
Eagleton, W. : 60(p).
Ebbasî : 8, 35.
Ebbas Mehmud 'Eqad :
210.
Ebdulhemîdê Duyem,
Sultan : 120, 124, 127, 128.
Ebdulhemîd, Sultan : 124.

Binêre : Ebdulhemîdê Duyem, Sultan.
Ebdulhemîd Han-i Sani, Sultan : 124.
Binêre : Ebdulhemîdê Duyem, Sultan.
Ebdullayê kura Kerîmê Fettah Begê Hemewendî : 107.
Ebdulezîz Yamulkî : 76, 218.
Ebdulezîzê kura Mistefa Paşa : 129.
Ebdurrehman Bedirxan : 127.
Ebdulwehîd Kerem, Dr. : 142.
Ebdurrehman Seîd : 125.
237
Edîb Ezîz : 134.
Edward, B. : 143.
Ebdulrezaq el-Hesenî : 87 (p), 144(p), 158(p), 178(p), 180(p),191(p),202(p).
Ebdulmecîd, Sultan : 52, 181(p).
'Ebdulwehab Mehmud : 174.

Ebdurrehman Axayê Sorekeşîra Şirnaxî :102.
Ebdurrehman Hacî Marif : 31(p).
Ebdurrehman Paşa : 114, 115.
Binêre : Ebdurrehman Paşaya Baban.
Ebdurrehman Paşaya Ba¬ban: 114.
Ebdurrehman Paşaya kura Mihemme Paşaya kura Xalid Paşa: 113.
Binêre : Ebdurrehman Paşaya Baban.
Ebdureqîb Yusif : 38.
Ebdurezaq el- Hilali : 110 (p)-
Ebdurrezaqê kura Necef Qulîxanê Dunbulî : 228.
Ebu Leys : 48, 49.
Edmonds, C.J. : 117, 125, 138(p), 156(p), 200(p), 212.
Ehmed Begê Towfîq Beg : 129.
Ehmed Behçet : 129.
Ehmed Osman, Dr. 215(p).
Ehmed Begê Fettah Beg :

216, 217.
Ehmed Begê Tewfîq Beg :
218.
Ehmed Xwaca : 133, 138,
218(p).
Elaeddîn Keykubatê Ye¬
kem, Sultan : 37, 39, 40,
41.
Elaeddîn : 42.
Binêre : Elaeddîn Key¬
kubatê Yekem.
Elaeddîn Saccadî : 117, 118,
125, 186(p).
"El-Bab el-'Alî" : 114(p).
El-Dîblomasîyyetu'l
Wefdîyye we 'Esbetu'l
238
Umem
El-Sîyasetu'l Duwelîyye
(kovar) : 87(p).
El-Ehrar (En Azadîxwaz)
(parti) : 174, 175.
El-Ereb (rojname) : 158,
162(p).
El-êxbar : 189(p).
El-îstîqlal (Seocwebûn)
(parti) : 174, 175.
El-îttîhadu'1-Wetenî

(Yekîtiya Nişstiman) (parti)
:174.
"El-Firat" : 147, 151, 156,
161, 164, 169.
El-Hîlal (çapxane) : 121.
"Elifba" (kovar) : 152(p).
"El-Istîqlal" : 147, 151, 169.
El-Merkezu'l Wetenî Lî'l-
Wesaîq : 154.
"El-Musewwer" (kovar) :
210,211.
El-Şe'b (Gel) (parti) : 174.
El-Terîq (kovar) : 69(p)."
El-Wetenu'l-Dimûqratî
(Nîştimana Demokrasi)
(parti) : 174.
"El-Teaxî" (rojname) :
207(p).
El-Xed (mucelle?) (kovar)
:190(p).
El-Zehra" : 219.
Binêre : "Zehra".
Elî Axa yê Kurd : 52.
Elîyê Bapîraxa : 129.
Elî Kemal : 130.
Elî el-Werdî, El-Dr. : 15(p).
Elî, imam : 47.
Elî Paşaya kura Muştaq

Baba : 53.
Elîşanê kura Mehmud
Paşa : 46.
ElîŞefîq:105(p).
Emîn Mutabçî, Dr. : 19(p).
Enstîtuya Rojhilatnasî ya
AkademîyaZanistî ya
Sovyetê : 58.
Enwer Mayî : 200(p).
Enwer el-Maî : 159(p).
Binêre : Enwer Mayî.
239
Ereb, Erebî: 7, 8, 11, 15, 16,
27, 37, 42, 44, 115(p), 118(p),
12Ö(p), 205(p), 208, 226,
227.
Ereban Şiî : 147.
Ermenî, Ermenîyan : 26
(p), 27, 35, 37, 46, 50, 69,
203, 205(p), 223, 224, 225,
226, 227.
Erşed 'Umerî : 176, 183.
Ertuşî (eşîr) : 74.
Esbetu'1-Umem : 111
Binêre : Komela Gelan.
Eshabêkehf : 118
Eşîra Delo : 143, 166.
Eşîra Dunbulîyan : 228.

Eşîra Goyan : 161(p).
Eşîra Kelhurê : 147.
Eşîra Koçgirî : 46.
Eşîra Sencawî : 147.
EşîretaSurçî : 101.
Eşîra Şikakan : 106.
Eşîra Zewbe'î : 145.
Ethem Efendî : 129.
Etienne Marc Quatremere
:22.
Etnografya Sovyet (kovar)
: 198(p).
Ewlîya Çelebî : 28, 50(p),
196, 197. 198.
Eyubî : 39.
Exramovîç, R. T. : 58(p).
Ezîz Xan : 159.
'Ebdullah el-Feyyaz, El-Dr.
: 158(p).
'Ebdulîlla : 181, 182, 183.
'Ecem : 112.
Elewî : 210.
Binêre : Binemala Mi¬
hemmed Elîyê Mezin.
'Efanîsyan, Aşot, Prof. :
228(p).
'Emare (eşîr) : 155.
"Erbete (gund) : 190, 191.

Fadil Huseyn, Dr. : 97(p), 180(p).
Faîq Begê Maruf Beg : 129.
Fakulta Hiquqê : 179, 180.
240
Fakulta Dermansazîyê : 181.
Fakulta Tibê : 181.
Faris Efendî : 134.
Fayiqî Tapo : 147.
Faris, Farisan, Farisî : 7, 8, 9,10,11,12,13,14,15,16, 17,20,22,23,27,35,9,116, 118,130,205,208,226.
Faîq Begê Maruf Beg : 129.
Faris Efendî : 134.
Faruq Paşa : 210.
"Fatimetu'l Zehra" : 219(p).
Fatme Mihyeddîn : 216.
Fatme: 216, 217, 218, 219, 222.
Binêre : Fatme Mih¬ yeddîn.
Fayiqî Tapo : 147.
Fazil Cemal ê Wezîrê Derve : 179.
Ferhad : 38.

Fermanrewatîya Bedlîsê : 29.
Fermanrewatîya Cezayîrê 54(p).
Fermanrewayê Misrê : 197.
Fermanrewatîya Venedî¬kê : 80.
Ferîq Behrî Paşa : 53.
Fetah Beg : 99.
Feyaz, Feyyaz : 158, 166.
Feyselê Yekem : 101, 104, 169.
Firdewsî : 227.
Fir'ewn : 161.
Fîtzgîbbon, Kapîten : 103. (Capitan Fitzgibbon)
Frensizi, Fransiz, Frensî, Ferenkan : 16, 21, 22, 23, 25,26,81,82,83,84,112, 120(p), 131(p) 146.
Frên, X.D. : 22, 30.
Fuad Mestî : 218(p).
Fuad Reşîd : 220.
Garabêtê Ermenî : 112.
241
Gelawêj (kovar) : 184, 186, 212.

Gelên Asya û Afrika (ko¬
var): 121.
Gelen Zaxrosê : 227.
Gerdî (eşîret) : 146.
Germîyan (eşîret) :41.
Germek : 47.
Gewereş : 48.
Geylanî : 118.
Ghassemlou, A. R. : 62(p),
76(p), 198(p).
Giraçîkovskî, Y. Yu :33.
Gira Me'fwan : 209.
Grekî, Grekîyan (Orîman)
: 13, 79.
Grînhaws : 159.
"Girrûgalî Mindalanî
Kurd" : 132.
Gîw Mukrîyanî : 125.
Goristana Şêx Ebdulqadirê
Goyje : 138.
Goyî, oyan (eşîret) : 140,
161.
"Gotebêjê Şoreşa" : 168(p).
Goristana Babu'l
Mu'ezzem : 185.
Goristana Seywan : 209.
Gordlevskî, V. A. (Gord
levskî Vladîmîr Aleksandrevîç)

: 31, 32, 33, 34, 35,
38, 39, 40(p), 41, 42, 43, 44,
45,46,47,48,49,50,51,52,
54, 55.
Gûneş : 52.
Gurganî : 41.
Gurcî:35,41.
Gurî (eşîret) : 41 .
Guzîde Xanim : 218, 219.
Binêre : Guzîde Ya¬
mulkî.
Guzîde Yamulkî : 219,
222.
Gökalp, Zîya : 66.
H
Hacî : 42.
Hacî Axayê Fethullah :
129.
Hacî Axayê Fethullah :
242
129.
Hacî Kak Ehmedê Şêx :
115.
Hacî Kak Ehmedê kura
Şêx Maruf: 115.
Binêre : Hacî Kak Eh¬
med.
Hacî Kak Ehmed: 115,

116.
Hacî Kak Ehmedê Şêx :
115,116.
Bnêre : Hacî Kak Eh¬
med.
Hacî Mele Ebdullayê
Celîzadeyê Köye : 116.
Binere : Mele Ebdullayê
Celîzade.
Hacî Mele Elî : 209.
Hacî Mele Eshedê baba
Hacî Mele Ebdulla: 119.
Hacî Resul : 208, 209.
Hacî Resulê Neqşîbendî :
207.
Binêre : Hacî Resul.
Hacî Qadirê Köye :125,126.
Hacî Musa Begê
Mîrzazade : 62.
Hacî Hesenê Şêrwanî : 52.
Hacî Seyîd ismail : 228.
Hacî Şêx Fewzî Efendî :
62(p).
Hafiz : 53, 227.
Binêre : Hafizê Şîrazî.
Hafizê Şîrazî : 53.
Hakkî, Naşît : 43.
"Hakimiyeti Millî" (roj¬

name) : 43(p).
Haldane, A. L. :143(p),
161 (general), 204(general),
204(p).
Hamîlton, A. M. : 61 (p),
65(p),205(p).
Hasretyan, M. A. : 69(p).
Hamawarî Kurd (kovar) :
132.
Harun Reşîd : 79.
"Hawar" (kovar) : 110,
112,
125(p), 132.
Hawarî Kurdistan : 132.
Hawarî Kurd : 132.
243
Hawarî Niştiman (kovar)
:132.
Hay, Kapîten : 145.
Hebeşî : 226.
Hebeş, Hebeşan : 79.
HebîbCematî:211.
Hejar : 30.
Helale : 132.
Hemdulla Qezwînî : 28.
Heme Axayê Ebdurreh¬
man Axa : 134.
Heme Ehmedî Taha :186.

Heme Qedrî :217.
Hemexayan : 208(p).
Binêre : Mehmet Axayê
nevîyê Zulal Axa.
Henderson (Hendirsin),
Mîster : 110.
Binere: Henderson, A.
Henderson, A. : 110(p).
Hepsexan : 97.
Binêre : Hepsexane
Neqîb.
Hepsexane Neqîb : 97(p).
Herekol Ezîzan : 125.
Binêre : Celadet Bedincan.
"Heres el-lstîqlal" : 142.
Hesen : 51.
Hesenî : 158, 166.
Hesenê kura Nureddîn :
24.
Hevalên Akademîya Zan¬
yarî ya Heyran : 47.
Hêrbîlo : 21.
Hindî : 203, 205, 206.
Hindiye Matbaasi : 124.
Hindûyên Pencabî : 153.
Hiseyîn Ewnî :62.
Hiseyn "Eli : 184.
Hîtler : 88, 92, 93, 94, 230.

Binêre : Schicklgruber,
Adolf.
Hoste Receb : 199.
Hukumeta Bexdayê : 114.
Hukumeta Komara
Tirkîyê : 61.
Hukumeta îranê :106.
Hukumeta îraxqê : 106.
Hulagû Xan : 39.
Husameddîn : 45.
244
Huseyn : 46.
Huseyn Huznî Mukrîyanî
:133.
Huseyn ê Şerîfê Mekkê :
169.
Hûn, Hûnên : 161.
Ibnu'l-Dînar : 40.
ibrahim Paşaya kura Mihemmet
Elî : 197.
ibrahim Hilmî, Dr. : 206,
207,211,212,214,215.
Idrîsê Bediîsi, Mele : 44,
45.
Idrîs, mele : 44.
Binere : Idrîsê Bediîsi,
mele.
"ihsan el-Sukkan" :

199(p).
Ingilîzî : 16, 21, 100, 205(p).
îngilîz, Ingilîzan : 56, 57,
58(p), 61, 67, 73, 74, 82, 84,
97, 100, 101, 102, 103, 104,
105, 106, 108, 109, 110, 121,
128, 129, 133, 134, 136, 137,
138, 140, 153, 155, 156, 157,
162, 172, 177.
"Intelligence service" ya
Britanya : 189.
Intiqam Matbaasi : 124.
lreland, P. W. : 167(p).
Ishaq Fuat, Dr. 125.1reland,
P. W. : 167(p).
Istyaczo : 17.
Izeddînê Keykawusê Duy¬
em, Sultan : 39(p).
Izeddîn Mustefa Resul,
Dr. : 212.
izzet Beg : 138.
izzet Begê Osman Paşa :
129.
I
îbnî Sîna : 226.
îcaza Şex Seraceddîn : 207.
îlhan, Musa Kazim
Paşazade : 202(p).

împaratorîya Bîzansî :
226.
245
împaratorîya Osmanî : 9.
îndîanên Sor (Kizilderîlî) :
10.
îndra Gandî : 11.
încîl : 226, 227.
îndo-Awrupî : 12, 16, 17.
înönû, îsmet : 69, 98.
Irana Sefewî : 226.
îsayî : 36, 44, 45, 100, 109,
163~ 168.
îsa, pêxember : 47, 168,
223.
iskender : 48, 49.
îslam, Islamiyet : 8, 15, 79.
îsmaîl Heqqî Şaweys :
218(p).
îtalî : 16, 205.
"îttîhad" : 64.
Binêre : îttîhat Terakki.
"îttîhat û Terakki" : 216.
J
Jaba, Aleksander : 25.
Jîyanewe (rojname) : 139.
K
Kamuran Alî Bedincan :

66.
Kamuran Bedirxan :
127(p).
Binêre : Kamuran Alî
Bedirxan.
Karduxî : 13, 15.
Kartsov : 200.
"Karwan" (kovar) : 78,
149(p), 206(p).
Katlov, L. N. : 142, 144(p),
146(p), 166, 197(p).
Kawis Qeftan, Dr. : 215(p).
Katib Çelebî: 21, 28.
Kela Amedê : 40.
Kela Bedlîsê : 48.
"Kemalî" : 57(p).
Kemalist, Kemalîstan : 57,
60, 61, 64, 65, 66, 67, 69, 70,
71, 72, 97, 104, 105, 136.
Kemal Fuat, Dr. : 117, 118,
126.
Kemal Mezher Ehmed,
Dr. : 96(p).
246
Kemal Mezher, Dr. : 20(p),
49(p), 58(p).
Binere : Kemal Mezher
Ehmed, Dr.

Kemser : 47.
Kerîm Begê Fettah Begê Hemewendî : 104, 137.
Kerîmê Rustem : 131.
Kerîmê Xesrew Beg : 166.
Kerîmê Heleke : 5.
Keykawîse Duyem, Sultan :39.
Keyxusrevê Duyem, Sul¬tan: 39,40,41.
Keyxusrevê Sisîyan : 40.
"Kurdistanê Kevin" : 13.
K. Kurdo : 22(p).
Ksnenefon (Xenephon) : 13, 15.
Kildanî (Keldanî), Kildanîyan : 9, 168.
Kitêbxana Akademiye : 123, 132.
Binêre : Kitêbxana Korrî Zanyarî Kurd.
Kitêbxana Bodleîan : 23, 24.
Kitêbxana Ebdurehman Paşa : 114.
Kitêbxana Korrî Zanyarî Kurd : 123.
Kitêbxana Liqa Unîversîta

Rojhilatnasî ya Sovyetê ya
li Lenîngradê : 122.
Kitêbxana Marburg ya Al¬
manya Rojava : 122.
Kitêbxana Nişţimanî
(Milllî Kûtûphane) ya Enqerê
: 122.
Kitêbxana Gişţî ya
Lenîngradê : 24, 25.
Kitêbxana Stenbol : 24.
"Kolonyalîzma Nû" : 192.
Komita Serokatîya Kongra
Erzirumê : 61 .
Komela Bilindbûna Kur¬
distan (Kûrt Teali
Cemîyetî): 128.
Komela Bilinbûna Jinên
Kurd (Kûrt Kadinlari Tea-
247
li Cemiyeti) : 128.
Komela Gelan : 73, 78, 81,
82 (Leaque of Nations), 83,
84, 85, 86, 87, 88, 89, 90, 91,
92, 93, 94, 95, 96, 97, 99, 100,
101, 104, 105, 107, 108, 109,
110,111,112,173,177.
"Komela Kurdistan"
(Kurdistan Cemîyetî) : 128,

129.
Binêre : Cem'îyetî Kur¬
distan.
""Komita Erzirume" : 76.
"Komunîzma Cîhanî" :
192.
Komela Netewên Yekgirtî
:174.
Kompanya "Reji" ya
Frensî : 216(p).
Komara Ermenîstana
Sovyetê : 225.
Komara Mahabad : 132.
Komela Ehdî Iraq : 146.
Komelî Eqwam : 112.
Binêre : Komela Gelan.
Komita Gişтî : 84, 85, 87,
92.
Komara îspanya: 92.
"Komîtê Kêmayetîyan" :
96.
Koma Milletan : 96.
Kongra Vîyanayê : 80, 81.
Kongra Aşîtî ya Parîsê : 82,
84, 87, 92, 95.
Kongra Lozanê : 98.
Kongra Stenbolê : 62.
Konsolosxana Rusya : 49.

"Kongra Netewen Rojhi¬
lat" : 65.
Korniyenko, R. P. : 70(p),
71(p),72(p).
Kongra Çjahîre : 101.
Konsolosa Britanya yê
Kirmanşane : 147.
Koşka Şahane : 177.
Kovara Akademîya Zan¬
yarî ya Ermenîstana : 228.
Kovara Gelên Asya û
Afrika : 28(p).
Kovarî Korrî Zanyarî
248
Kurd:31(p),112(p),113(p),
115(p),116(p),119(p),129
(p),224(p),227(p).
"Kurdistan" (rojname) :
120, 121, 122(kovar) , 123,
124, 125, 126, 127, 128, 132
(kovar), 138 (rojname).
Kurdan ColemêrgV : 202.
Kurdnasîya Sovyetê
(Kurdnasên) : 30, 232.
Kyros (Kîros) : 13.
Binêre : Kyrosê Mezin.
Kyrose Mezin : 14, 17.
Kûçûk Silêman Paşaya

Bexdayê : 114.
Kûrt Te'amîmî Maarif ve
Neşriyat Cemîyetî : 128.
Lazerev : 232.
Lenc, Deter : 198(p).
Leylan (eşîret) : 166.
Lawê Şêx E. Fetah : 127(p).
Lichmen, Kapîten : 145,
146, 161 (kolonel).
Lînç : 47.
"Licnetu'l 'Eqelîyye" :
96(p).
Binêre : Komita Kêmayetîyan.
Liqa Musilê ya "Komela
Ehd" : 159, 160.
Binêre : Cem'îyetu'l-
'Ehd".
Longrigg S. H. : 140, 143,
144, 164, 178, 186(p), 189
(p).
M
Macarî (Hungarî) : 205.
Macîd Mistefa : 138.
"Medher" : 45(p).
Binêre : E'raf.
Makkant, Kapîten : 104.
Malcolm, J. : 21, 22.
Mamoste Emîn Zekî : 115,

116,118,122(p),125,194.
Binêre : M.Emîn Zekî.
Marko Polo : 80.
Marksizm : 20(p).
Marks : 211.
249
Maruf Xeznedar : 31 (p),
117,125.
Maştots, Misorp : 223(p)
Matênedaran : 223, 226,
227, 228, 229.
Mayesîef, P. P. : 69(p),
72(p).
Mecîd kura Elîyê Hemewendî
: 135.
heta bi yên herî barbar jî vedikşîne nav şaristaniyê" (Manîfestoya Kominîst. Ji beşa Bûrjûvazî û Proleter) wêdetir, ji demekê vir ve Bakur û Başûrî (yê "şareza" û yê "barbar") dikşîne nava buhranek kûr. Ligel ronî-bûna sedsala 18. hin disîplînên ku pêşveçûna mîna rabûn, modernîzm û navendîbûn, kesîtîbûn;êdî û ji mêj ve piştî ku Çîn-Hindistan-İran TirkiyeMisir
ku "hatin vekişîn nav şaristaniyê" bûne nirxên vana jî. Nexasim di salên 2000 î de ku aborîya kapîtalîst ji ber vê jî, giraniya hilberînê ji Rojava vekişî Rojhilat; nirxên ku bi şaristaniya senayî ya kapîtalîst ve hevpişk
in yên mîna aborî, siyasî û bere bere yên çandî, bûn / bûne realîteya civakên
Rojhilat jî.
Gelên Filîstîn û Kurd hêna dewletên xwe yên netewî ava nekirine û
hin gelên din yên ku dê pêvajoyek hevşib bijîn; dê gelek tiştan ji modernîzmê
û disîplîn û avahiyên wê yên civakî, aborî, siyasî bistînin;ango merheleyên ku wê bijîn û biborînin dê hebin. Lê belê bi Rojava û Rojhilat ve

bigiştî pirsgirêk û nakokiyên gelan yên bi modernîzmê pir dibin, dê pir bibin.
Ji ber ku; ji sedsala 18. ve bi taybetî seranserî sedsala 20. ji kominîstan heta faşîstan, ji lîberalan heta muhafezekaran, ji humanîstan heta despotan
hemû disîplînên siyasî; ji YCSS heta DYA, ji Fransa heta Çîn-İraq-Tirkiye, ji Kûbaya Sosyalîst heta Şîlîya Faşîst û paşîn heta bi Libya, hemû rejimên siyasî (dewlet û rêveberî) modernîst bû. Yê enternasyonalîst yê neteweperwer
û heta yê mihefezekar jî modernîst bûn. Ji alî felsefî ve bête
nêrîn; fitîrust, nihîlîst, romantîst, şoreşger, lîberal û heta bi qismen klasîst jî
tê de herkes ji modernîzmê xwedî bû.
Pirsgirêka ku pê rû bi rû ne; bi vê avahî û tevna xwe î siyasî, îdeolojîk, heta felsefeya dijber û bi vê tevlîheviya xwe ve modernîzm, di sedsala 21. de nikare barê mirovahiyê hilgire û dê hilnegire.
Ji ber ku nikare hilgire, modernîzm, postmodernîzm wekî felsefî ji kolaja (buxçeya pînekirî) nû û kevn afirand.
Ji ber ku nikare hilgire, li şûna hewla buhurandina fordîzmê ya di rejima kedê de, postfordîzm (hilberîna sade, vezîn hwd.) dîsa mîna buxçika
92
pînekirî tevlîhevkirina nû û kevn radixe ber çavan. “Li her cihê ku modela Fordîst-Taylorîst lê hatiye buhirîn de, postfordîzm hem agahdarkirina ji nû
ve xwedî lê derketina karkeran e, hem jî heta bi heta hebûna karkera ya kesî bi temamî tê bend kirin, çi bigre bi temamî gavek ji par re çûn ya berbi girêdana wan e.” (Andre Gorz, Yaşadigimiz Yer, r. 50, Ayrinti Yay.)
Ango bi daneyên “agahdarker” ya dahatû ya nû, wekî kevn ?ji par re çûn”

jî, ji bo karkeran pratîka koletiya çaxa navîn dide jîyîn, di bunya heman palûke an şîrketê de tê jîyîn.
Ji ber ku nikare hilgire, modernîzma ku pêşiyê di kevneşopiya Awrûpa de, di her qadê de ji rabirdûyê qetandin temsîldikirî, niha ji nû ve kevneşopiyê, rabirdûyê himbêz dike. Bi hewlên di navbera buhurandina netewîtî
û vegera bo netewîtiyê de modernîzm bênefes dimîne.
Ji ber ku nikare hilgire û ji ber ku modernîzma Rojava ku sînorên siyaseta aborî ya pêşveçûnê nikare biborîne, YKSS û rejimên sosyalîst yên din, wekî serdestiya çand ya civakê, bêyî bigihîjin kominîzmê ruxuyan.
Kominîst, gava ku modernîzm û disîplînên wê yên berbiçav rexnebikin û lê bipirsin; li şûna wê wekî alternaîf ne ku postmodernîzm an jî “koşka elektronîk” “kapîtalîzma ku ne kapîtalîzm”, “teknokratan” an jî “civaka agahdariyê” hwd. deynin ku evana alternatîfên ku kapîtalîzmê derbasnakin,
divê alternatîfê li derveyî milkiyeta kapîtalîst ya taybetî û rejimên siyasî, bigerin. Ev alternatîf, wekî rejima derbasbûnê sosyalîzm û wekî armanca nîhaî ya civakê, çand serdest kominîzm e ku di vê rewşê de disîplînên ku siyasetê li navdixe dê were buhurandin. Di jiyana mirov û civakê de, civaka kominîst ku li dijî zagon û disîplînên spartî zagonan ku ev derveyî ne, çanda ku hundirî ye dê lê serdest be. Heger wekî pêvajoyek bêdawî moda-modern ku tumî pêşveçûnê, hemdemîbûnê, berbi nûbûnê temsîl dike;
divê ev ne bi hilbera modernîzm ya hilbera sedsala 18. ya ku bere bere veguheriye disîplînek şaristaniya senayî, neyê sînor kirin, ji ber vê, ne civaka kapîtalîst ya ku ?bi bendên ling yên nav xwe” rû bi rû dimîne û dixitime,
ancax sosyalîzm / kominîzm ya bêdawî ya dê hilbera dînamîkên

şoreşa sedsala 21. ne, dikare wekî pêvajoyek bêdawî ji heqî hemdemî-bûnê ji nû ve derkeve. Ancax sosyalîzm û pêvajoya wê î jor kominîzm ya çand serdest kare zanistê û heş ji bindestiya zagonan derbixe.
Wekî Tevgera Kominîst ya Kurdistan, ji xwecihî li cîhanê nêrîna me ev e.
93
ŞARİSTANİYA SENAYÎYÊ XWEZA Û MİROVÎ
BER Bİ TUNEBÛNÊ VE KAŞ DİKE
Şaristaniya senayî ya kapîtalîst di nav pêvajoya geşedanê de ligel ber bi merhela xeridîn û ruxînê ve diçe, xwezayê û mirovahiyê jî bi xwe re kaşî felaketê dike. Kapîtalîzm bi qanda ji alî jeopolîtîk ji demekê vir ve ji alî ekolojîk ve jî dinyayê tehdît dike. Çawa ku dîroka wî (ku dîroka ew çêdikin) û tekamûla wî heye, dîroka dinyayê ku ew jî parçeyek organîk yê wê ne û di nav vê dîrokê de tekamûla dinyayê heye. Midaxeleya îradî ya şaristaniya senayî ya kapîtalîst ji bo erdkûreyê, di van salên paşî de ku pir jê tê qal kirin, hevsenga ekolojîk ya dinyayê xera dike. Ji ber ku erdkûre û xweza li şûna ku tekamûla xwe bijî, bi giranî tûşî midaxeleya der tê.
Dinya jî mîna organîzmayek jîndar, ligel hevsengên hundir û der tevdigere.
Bi kurtasî dinya me jî xwedî pirsgirêk ku li ser hevsengên xwe yên der û hundir û siheta wê girîng neyê dîtin, dê nexweş bikeve û sicara wê bilind bibe. Bilind jî bûye, ji ber ku em bêhtir bi heqîqeta germa kûrewî re rû bi rû dimînin. Û berpirsiyarê vê sicarê ji sedî nod bizawên mirovahiyê
ne.
Ligel vedaxistina teknolojîk ya zanistê mirovê ku serdestiya dijî xwezayê bidest xistiye, ne di ferqê de ye ku sînorekî wê heye, an jî vî sînorî paşguh dike, ji midexeleya îradî ya xweza û dorhêlê, wêdetir, bêgiram û

bi dijminantî tevdigere, heman xweza dê bedêla vê bizavê bi giranî bistîne. Dest bi standinê kir jî. Engels bi gelek salan berê, ji vê hêlê ve hişyariyek
wiha kiribû:
“Lê belê divê em zafera mirov ya li ser xwezayê nenepixînin û xwe nepişpişînin. Xweza dê heyfa her cure van zaferan hilîne. Raste; her zafer, berê encamên ku em li bendê ne diwelidîne; lê paşê gelek ciyawazî, tesîrên
pêşnedîtî û piranî tesîra encamên ku berê bidest ketibûn ji holê radike, dike. Gelên ku li Mezopotamya, Yunanîstan, Enetolê û li derên din, ji
bo araziyê çandiniyê bi dest bixin daristan şewitandin, nizanibûn ku merkez
û gencîneyên nemê jî tunekirine…Loma di her gava me de, mîna ku em derî xwezayê ne, li ser wê, ticaran weke fatihekî ku li ser gelekî biyanî serweriyê bike, - lê belê divê em zanibin ku bo goştê xwe, bi mêjî û xwîna xwe em aîdî xwezayê ne û tam li navenda wê radiwestin, serwerîya me ya li ser wê, di eslê xwe de tenê hînbûna rêzikên wê û kêrhatina bika-
94
ranîna derbarê vê piratîkê de em ji afirendeyên din bi awantajtirin- bi bîra me dixe. “(Yê radigihîne Alex Callînîcos, Antî-Kapîtalîst Manifesto.
Hêjmar 49, Weşanên Lîteratur)
Bi kurtasî di koka xerabûna ekolojiyê de tevgera burjûvazî ya kuştina xwezayê ya bêhtir kar-mêjtin û bi xirsa destxistina milkiyeta takekesî heye.
Di xerîdîn û hilberîna li ser erdkûreyê; ji ber berdana kildûmana avê, azot oksît, metan, karbondîoksîtê, li hember hemû hişyarkirinan bilez zêde dibe,

bi taybetî jî emisyonên xazê ku ji trafîk û senayiyê derdibin sicara erdkûreyê
“2 pîle” bilind bûye. Mirovên zanistê, germbûna okyanûsan û helîna qatê qeşayê yê Gronlandê bi vê geşedanên ve girêdidin. Di berdana gazên sera yên bo atmosferê; bi rêzê YDA, Awustralya, Kanada hwd. dewletên
geşbûyî yên emperyalîst- kapîtalîst, ango navendên şaristaniya kapîtalîst serî dikêşin.
Hevpeymana Dorhêlê ya Guhertina Sirûştê” ya ji alî NY ve ya li Kyotoê hatiye amadekirin, ne belgeyek di rewşa ku karibe li dijî germbûna Kûrewî têkoşîn pê were dayin. Belge, li dijî felaketek ekolojîk reformên cidî
jî têkvenaxwe; ji ber ku grûbên ji semayeyê wêde bakurê dewlemend yên emperyalîst, ku ji tunebûna jiyana peykê agahdarin jî, livbaziyên xwe naguherînin. Sicara Kûrewî, gav bi gav berbi merheleyek krîtîk ya veneger ve pêş ve dere; xweza jî bi refleksa xweparastinê dest bi nîşandana reaksiyonên
cidî kir. Zêdebûna şewata daristanan, pêlên hewa germ, kêzikên zîreetê, lehî û brûskên ji nişkê ve, zuwahiyên ku tunebûnê; zêdebûna asta bilindbûna ava deryayê, mezinbûna xetereya binavbûna bajarên ber deryayê,
xetereya bêav mayina bimilyaran mirovan û di salên paşiyê de
pêkhatina bahozên bihêztir…. Evana çend ji felaketên mezin in. Heger morovahî vê dijberîya xwezayê cidî negre û gavên pêwist navêje, rû bi rû mayina raberî dij êrîşa xwezaya ku her tiştî bimale û paqij bike dê jê veneger
be.
Di rîya çareserkirina bilez de pêwist e gavên lezgîn werin avêtin. Bi

kêmanî, mirovahî, ji bo daxistina sicara kûrewî bi gav avêtinên pêwist rû bi rû ye. Çareserîya esil, ango rihetbûna xwezayê ya paşîn jî ancax, bi dawîkirina
sazûmana xerîdar-hilberîn ya kapîtalîst ya ku kar û mêjtinek
bêdawî û bi derbasbûna aborîya hilberî û xerîdarî ji alî diviyahiyên jîyanî ve, gengaz e. Ku ew jî bi pêkanîna guhertinên bingehîn yên mirovan yên derbarê dorhêl û xwezayê gengaz e. Ango di çapa dinyayê de, bi guher-
95
tinên bingehîn yên şoreşger ku dê paşî li şaristaniya kapîtalîst bîne, ancax rizgarîya mirovahî û xwezayê dê pêk were.
KUREWÎBÛN, EMPERYALÎZM Û GEŞEDANÊN NÛ
Kozmopolîtîzm / gerdûnîbûn ango bi biwêjek ku di salên paşîn de bû-
ye moda, kûrewîbûn ne nû ye. Rehên wê heta, dema ku mirovahî, piştî helîna qeşayê derketin derve û li şûna hevdan û seydvaniyê ya ji bo li pey bazdana diviyahiyên xwe;derbasbûna şoreşa werzeyê ya wekî li gund-bajarê
ewil bi cîh bûne, dirêj dibe. Li hîlala biadan gund û bajarên pêşîn ku
her lêgerîna qalikên xwe yên aborî, civakî, çandî ku bo sînorên xwe derbas
bikin, gavên pêşî yên gerdûnîbûnê ne. Ev gavên nû li nav civakên gund-bajarên kevnar yên li rex Dîcle-Ferat, Nîl Ganj û Huang Hi (Çemê Zer) hat jîyîn.
Riya hevrîşmê ku ji qiraxên Deryaspî destpêdike û sero-bin ku ji Asyayê heta Çîna kevn dirêj dibe; pira hevakam ya têkiliyên nav gel / civakan yên li vê erdnîgarîya fireh ya siyasî, leşkerî, bazirganî, bi qanda vê jî çandî, felsefî ya li vê erdnîgarîya fireh de bû. Li ser vê rîya karwanan ya ji qiraxên Deryaspî heta Kurdistan - İran- Afxanistan-Pamîrê dirêj dibû, bi

navberên diyar, cureyek Herêmên Serbest yên wê demê ku jê re "Qûleyên
Kevirîn" dihat gotin; li van deran bazirganên ji Rojhilat û Rojava dihatin, hevûdin didîtin û danûstandinek dewlemend pêk dianîn. Ligel trampekirina
malên bazirganiyê, "ligel herkên felsefe û olî (Budaî) di warê pîşeyê de jî ragihandina nimûne û kevneşopî (Pîşeya Helenî) rola sereke lîst" (Larus a Mezin) divê bête gotin ku gerdûnîbûn / kûrewîbûn ne nû ye.
İmperetorîya Pers ya ku 300 salan ji Hindê heta Balkanan serwer bû; dijê vê ji Balkanan ta Hindê İskenderê mezin li ser gotina "İmperetorîya dinyayê ya spartî yekîtiya dilan" her çend spartî hêza çekdar bûn jî li erdnîgarîya
ji Balkanan heta Hindê, derbasbûnên leşkerî, siyasî, çandî hatiye jiyîn.
Hê weha bû, bi gavên mezin ku di wê pêvajoyê bilez bikin, ket dewrê. "Burjûvazî bi mêjtina bazarekê re fonksiyonek kozmopolît da hilberîn
û xeridîna her welatekî. Kevneperest di kederek kûr de xeniqand, ji bin lingên senayiyê, bingehê netewî yê ku li ser radiweste kişand û girt. Hemû senayiyên netewî ku bere bere hatibûn avakirin ruxiyan û hêna jî diruxin… Şûna girtîbûna xwecîh a kevn û netewî, têra xwekirinê em dibî-96
nin ku hevgirêdanên hevraber yên pir layen cîh digrin" (Manîfestoya Kominîst.
R. 114. Weşanên Çep) Marks – Engels gava ku di Manîfestoyê de, ne bahsa "kişandin" an "ruxandin" a bingeha aborîya dewlet-neteweyên modern yên roja me; wekî senayiya xwecih (netewî) ya girtî ya xasî feodalîzmê,

ku ji alî senayiya mezin ve dihat ruxandin qal jê dikirin û bi vê
yekê di heman demê de bahsa meyla kûrewîbûna sermayeyê jî dikirin.
Paşiyê jî Marks ?bi hevkarîya di nav neteweyan re, ku ruxandina gelek cure
neteweyên ku têraxwebûna wan têk dere, dîrok jî bere bere dibe dîroka dinyayê" (İdeolojiya Alman. r. 66) digot û makîneya ku li Çîn û Hindê nanê bihezaran kedkaran ji dest derdixe, li İngîltere îcad dibe re, "ev îcad buyêrek dîroka gerdûnî ye" dê bigota. Marks-Engels, ku înterneta sanal ya
otorêya agahdariyê, hecma bazirganiya di navbera Çîn û YDA ku digihîje 500 milyar Dolarî, veguhestina senayi ya navbera parzemînan, hecma ku borsa gihîştiyê û erdnîgarîya ku lê belav bûye di asta gerdûnî ya bejayî, derya û hewayê, hevgirêdana enerjiyê ya di navbera Rojhilat û Rojava de û ya paşî, pêvajoya YA bidîta, gelo dê ji bo dîmena "hevgirêdana hevraber ya piralî ya neteweyan", ji bo meyla sermayeyê ya buhurandina dewletneteweyê
û fonksiyona hilberîn û xeridîna her welatî ya kozmopolît re dê çi
bigota, mirov miraq dike.
Ji duh heta îro kozmopolîtîzm (kûrewîbûn) wek pêvajoyekê û helbet dibin akama siyasî, îdeolojîk, çandî ya aktorên kûrewî ya herêmî, xwecihî ya her dewrê de xebitî, geşbû, geşdibe.
Komîna Parîsê, Şoreşa İlonê û pêngava mezin ya sosyalîst ya sedsala 20. jî, meşa di rîya dirêj ya ku dere kominîzma hemdem de; di perspektîfa gelan û kedê de gerdûnîbûn bi xwe bû. Bi şoreşên li pey Şoreşa İlone ve, li Awrûpa û dinyayê, karibûya derbên mirinak yên paşîn li sîstema emperyalîst-kapîtalîst
bidana, ango li nîvê rê nexitîmîbûya û nemayibûna; ev
pêvajo di bin bandora ked û gelan de rakirina sînor û paseportan; di qada

cîhanê de, newekheviya di nav gelan / civakan ya di her qadê de hevkarî-alîkarîya enternasyonal û derbasbûna raberhev ya wekî civakî çanda dewlemend
entegrasyona tora têkiliyan, kûrewîbûnê re, rê vekirana. Misyona
ku ji vê hêlê ve li şoreşên sedsala 20. barkirî, piştî xitimîn û ruxandina rejimên
sosyalîst re ev fîîlen dewrî şoreşên sedsala 21. bûn.
Burjûva, bi taybetî ji sedsalên 1990 î vir ve; ji aboriyên netewî yên ciyawaz û balavbûyî wêdetir û ya girîng li bazara navnetewî û hevkariyê,
97
sermaye bi guhaztina senayî – teknoojî û meta re, di armanca afirandina bazara dinyayê de pê li xazê kir, di vê yekê de, du faktoran, rola diyarker lîstine.
Yekemîn; ruxîna bloka sosyalîst û YKSS, vekişîna pêla şoreşa sedsala 20. û ji par re çûna cidî ya di tevgera karker û kominst de, sermaye, bi rizgarîya wekî ji zexta ji çep ya sosyalîzmê di demek kurt de ku hevdana gavan, borandina aboriyên netewî, girêdanên ling didît, pêvajoya kûrewî-bunê da lezandin. Ji ber dîtibûn ku di demek nêz de xeyaleta kominîzmê dê çekê ji dest bigre û berî bidiyê, ne li Awrûpa ne jî li dinyayê nemabû. “Giştîbûna ku sermaye bêrawest berî didiyê” ango lêgera kûrewîbûnê ku ji rûtînê wêdetir lez daye xwe de, di serî de ev faktor heye. Lê belê sî-norên kûrewîbûnê yê ku sermaye aktorê wê ye, sînorên xwe hene. Ev sî-nor ji aliyekî ve ji “lingirêk” an jî ji bariyerên hundir yê sermaye bixwe “ji hundirê avahiya xwe” ye. Ji aliyekî din, wekî bitûniya tevgera pêşverû, şoreşger,
kominîst ya dinyayê ku dê ji nû ve an dê vekêşîne sînorên netewî
an jî bêyî ku vê firsendê bidê, dê bi temamî bavêje sergoyê dîrokê.
Duwemîn; barê krîza ku kûr dibe li pişta girseyên kedkar û bi giştî li

pişta karkeran û bi taybetî li ser gel / civakên Başûrî belavkirin. Piştî ku tenê li Wîetnam, Çîn û Hindê nêzî 1, 5 milyar hêza kedê ya bi mûçe ya erzan, rasterast an nerasterast ji mêjtina sermayê re vebû; hem barê krîzê
ji nû ve li Başûrî belav bû û hem jî di serî de betalî pirsgirêkên hêza kedê ya Bakurî (YA, DYA) giran bûn. Di salên paşîn de siyaseta neolîberalîzm û kûrewîbûnê ya kapîtalîst bi armanc hate lezandin û di çapa dinyayê de ji nû ve rê dide mêtingehkariyê. Ewqas ku di vê pêvajoyê de, emperyalîstkapîtalîzm
tevî gelê xwe, morovahiyê wekî madî, derûnî ji nû ve dike
mêtingeh.
Li dijî encamên kapîtalîzma ku kûrewî dibe; ji formên sivîl yên civakî ta çepgirên neteweperwer yên netewî, ji şîrketên zîreetê yên biçûk û navîn
ta herkên dorhêlê û heta bigihîje girseyên kedkar, karkeran, tevgerek fireh ya mixalefetê mezin dibe. Bi qanda dîrokî ye, yê rojane armanca kominîstan;vê
mixalefeta ku di baweşîngek fireh de ye raberî encamên kapî-
talîzmê yên ruxanker bide rawestin.
Yên teza “împertoriyê” hildiberînin ligel ji trenda kapîtalîst ya kûrewîbûyî bi rê dikevin û diyarde û hûrandinên Lenîn yên derbarê emperyalîzmê de, buhurîne, dibêjin. İro yên serkêşiya van tezan dikin M. Har û A. Negrî: 98
“Ancax em ku dibêjin ‘împeretorî’ ji ‘emperyalîzmê’ bi temamî qesda tiştekî ciyawaz dikin”; “İmperetorî navgînek rêveber ya bêxak û bênavend
ku hemû erdkûreyê dixe nav bihûdên xwe yên fireh û vekirî ye”;ji ber ku

“têgiha împeretoriyê di bingeha xwe de bi tunebûna sînoran ve tê wesfandin”;
leza xwe kêm nakin û “em dibînin ku împeretorî rejimên zalim yên îqtîdara modern ji holê radike û di heman demê de potansiyela azadiyê fireh dike”; “damezrandina împeretoriyê tê wateya kûrewîbûna têkiliyên çandî û aborî”, “Di heman demê de ji fikra împeretoriyê ya di komarek demokratîk de” “YDA împeretoriyek hemdem e” dibêjin û wê wekî adresê
nîşan didin. (İmperetorîr. 18-19-20-68-183-197 Weşanên Ayrintî)
Bersivandina van îdea û yên wekî van, derî guncana vê belgeyê de ye.
Yên ku em bêjin tenê têkiliya di nav buyêra emperyalîzmê de û dê sînorkirî
be.
Rêveberîya bênavend û bêxak ancax di civaka kominîst ya çand serdest de dikare pêk were. Bi giştî, di şertên milkiyeta kesî û bi taybetî di şertên rejimên siyasî û kapîtalîzmê de ev ne gengaz e. Di şertên kapîtalîzmê
de, ne rêveberîya bênavend û bêxak, lê belê ya ku nêzî rêveberîya navendiya parzemînî ye û ku ber bi vê ve gavan davêje, ne DYA ye, YA ye. Ku pêvajoya YA, çawa bi bariyerên hundir û derve re rû bi rû dimîne an dê bimîne tê dîtin. Wekî din, ligel hebûna ji 200 dewletên netewî, federal;
hebûna nîskokên emperyalîst yên mîna YDA, Rûsya, Çîn, YA û Japonya yên diyar, teza “împeretorîya bênavend, bêxak” dirizîne.
Yên ku împeretoriyê “komarek demokratîk” û YDA jî “împeretoriyek hemdem” dibînin û pêşkêş dikin û gava ku wekî “rejimên zalim yên rêveberîya
modern” Talîban, îqtîdara Sedam Hisên ji alî YDA û mitefîkên wê

ve hatin ruxandin, bêyî wahşeta ku wan nîşan da, bê dîtin, yên ku di bin paletên tenkan de “potansiyela azadiyê pir dike” dibêjin, li holê ye ku YDA, li Asyayê, di bin perdeya “azadî” yê de li pey kîjan berjewendiyan e û ligel ku Siltanê Misrê yê kerr jî bi vê yekê hesiyaye û bêyî vê bibînin û yên wê “komara demokratîk” an jî “împeretorîya hemdem” îlan dikin; an ji alî heş ve kor in an jî parêzvanên emperyalîzmê yên şerletan in.
Em wekî Tevgera Komînîst ya Kurdistanê; teza împeretorî û wekî ku pê ve girêdayî van dîtinên hatine hilberandin red dikin, gazî redê dikin.
Pêşnumeya “împeretorîya dinyayê” ya felsefevan Gîambattîsta Vîco û zanistê
siyasetê Montesque ev, “Koma Dewletên mezin” ya bi zagonên giştî
99
ve girêdayî ya Hugo Grotîus, Danezana Mafên Mirovan 1789 ya Fransiz, teorîya “aştiya ebedî” ya İmmanuel Kant, fîlozofê Sînopî yê dibêje “welatiyê
dinyayê me” ancax û ancax di civaka kominîs de ya ku Marksîzmê ku di Manîfestoya Kominîst li ser van utopya û gavên dîrokî hilberiye hatiye pêşdîtin de, “bêmerkez, bêxak û bêsiyaset civakên komînal yên dewlemend
bi biratî û yekîtiya wan ya azad dikare pêk were. Dinyayek wiha;
utopya gelan e, utopyaya me ye jî.
Tehlîla emperyalzmê ya Lenîn, bi xetên xwe yên giştî ve, hêna jî rewaca xwe diparêze; lêbelê hin geşedan jî divê neyên pişтguh kirin. Li parzemîna Awrûpa, pêvajoya gavên ji dewletneteweyê wêdetir têkvedixwun, du dewletên emperyalîst yên Awrûpa û bi şerên navbera wan yên bixwîn tên nasîn Almanya û Firansa û helbet sermayeya İtalyayê, perên netewî, sînor,
al, sembol û nirxan di leha nirx û sembolên YA de ku li paş dihêlin, ji nav

grûbên sermaya navnetewî geşedanek berbi qartelên sermayê yên ji netewe
wêdetir hwd. ku tê jiyîn; ev tên wê wateyê ku hin geşedanên nû hene.
Lê belê ji van geşedanan, divê behsa "împeretorîya wêdeyî netewe" an jî "ultra emperyalîzm" ê neyê krin. Ji ber ku raberî van geşedanan nakokî û pevçûnên di nav wan û van navendên hêzê yên emperyalîst de, didomin. Ligel bi stratejiya serdestiya Awrasya ya YDA re meyla pêvçûn û nakokiya nav emperyalîstan ji nû ve kûr dibe. Tifaqa emperyalîstan ya li ser Afxanistan
ku ji ber wesfa Talîban û germahiya êrîşa 11 İlona 2001 ê pêk hatibû,
bi êrîşa İraqê re xerabû, heta ciyê xwe ji bezandinên neyekser re hişt. Dagirkirinek
leşkerî ya İranê jî, dikare meyla pevçûnên yekser yên navbera emperyalîstan, ji nû ve biafirîne. Ancax hebûn û mezinbûna sermaya YDA û yên din yên Çîn û Hindê, dijberê vê jî îxracata Çîn û Hindê ya bo bazarên YDA, YA, Rûsya ku bere bere pirtir dibe; wekî din bi zewaca şîrketan
ya wêdetirî netewe, ger li welatekî emperyalîst yê X, Z ger hevkarîya van ya ligel welatê sêyemîn ku pir dibe, pevçûnek yekser ya di navbera emperyalîstan de freh dike; ku ji dewra Lenîn ciyawaztir, ji ber çekên nukleerî,
şerekî di navbera emperyalstan de, tevî wan hemû mirovahiyê heta
ku heqîqeta erdkûreyê bi bitûnî dixe bin gefan jî tevlî vê bibe; evana hemû
îhtîmala şerê nav emperyalîstan yê yekser kêm dike, lê bi temamî ji holê ranake.
Nakokiya nav mêtingeh û gelên bindest; ligel tesfiyebûna saziya mêtingehî ya klasîk, bi şeklî hatiye borîn. Di serê sedsala 20. de, ji xeynî
100

îstîsnayan, pirsgirêkeke dinyayê ya wekî mêtingeha klasîk êdî nîne. Lê belê emperyalîzma li Başûrî ku ji ber derî hatibû qewitandin, ligel ku di pencirê re dîsa ketiye hundir; nakokiya navbera gelên Amerîkaya Latîn, Afrîka, Asya û emperyalîzmê tûşî guherînê bûye. Bihûdê siyasî yên nakokiya
tazî ligel ku lawaz dibe; bi têkvexwarina aborî, civakî, çandî ve layenên wê yê civakî-çînî derketiye pêş. Serxwebûna netewî ku layena (armanc) diyarker ya şoreşên tevgerên rizgarîya netewî ya Afrîka, Asya ya li sedsala 20., di sedsala 21. de ciyê xwe, ji şoreşên civakî ku serxwebûna aborî jî armanc dike re hiştiye. Êdî şîara ?Hemû karkerên dinyayê û gelên bindest yekbin" di roja me de ji rewacê derketiye. Ji ber bi awayekî diyarkirî
li çapa dinyayê pirsgirêka netewî hatiye pişkaftin, li şûna vê divê "Çî-
na karker ya dinyayê û gelên tên mêjtin biyekbin" bête gotin.
Li Bakurî para zîreetê di Hevdana Hasilata Netewî ya Nesafî de" (H.
N. N) ji %3 û heta ji % 10 ji par re çûye, ango wekî hevalbendê çîna karker gundîtiya biçûk û navîn ji hêzek ku bahs jê bête kirin derketiye, ligel mezinbûna têketinên teknolojîk yê zîreetê, bi hêjmarî tê dîtin ku karkerên
zîreetê jî jar bûne.
Ji ber, weke diyarbûyî buhurandina tekoşînên serxwebûnê yên netewî, ji ber hem geşedanên kapîtalîzmê ya ufkî û qincî, gundîtî; bi awayê burjuvaziyê
xakê û zîreetê, gundîtiya biçûk û navîn û karkerên zîreetê, perçe
bûye. Ev, wekî pêvajoyekê didome. Ji ber vê yekê li Asya û Afrîkayê jî bingeha
tifaqa giştî ya karker-gundî, ji holê rabûye, radibe. Êdî, mîna ku şoreşên siyasî yên ku burjûvazî dê pêşengiya wan bike nayê jîyîn, faşîzma

vekirî an jî rejimên leşkerî li derve bête hiştin, stratejiyek şoreşê ku bi burjuvazî
re tifaqê têkveduxwe êdî nikare bête armanc kirin. Li şûna vê tifaqa karker-gundiyên kedkar (xizan) ku dê li gor rewşa welatekî ku teşebigre, divê ji alî tevgera kominîst ve were rojevandin.

DÎROKA Jİ NÛ VE Lİ LAYENÊ DİGERE
Û TEKOŞÎNA SOSYALÎZM Û AZADİYÊ

Sosyalîzma reel ruxiya ancax, sosyalzîm bi bin neket. İdeayên “Sosyalîzm, bi binketiye”, “kominîzm çewtiya dîrokê ye” bêvac bêspartek in. Kominîzm
(kominîzma îptîdaî) navê sosyalîzmê ku mirovahî, di raboriyê de,
bi hezaran salan berê, di nav wekhevî, azadî û biratiyê de jiyabû, ye.
Çewtiya dîrokê an jî ji rê derketina mirovahiyê ya mezin; ji cavaka îptîdaî 101
ya ewil, berîdayina sazûmana mêjtin, bi çîn, bi milkiyeta takekesî ye.
Çewtî an ji rê derketina dîrokî ya mirovahî ev e û mirovahî bi hezaran sal, bi taybeî 150 salên vê paşiyê, ji bo, li hevrastkirina vê çewtiyê têdikoşe.
Di sedsala 21. de şaristanî û dîrok ji nû ve di lêgera layen û têkvexwarinê de ye. Dînamîkên gelên karker kedkar û kominîst, şoreşger, pêşverû, ji bo dîroka ku ji nû ve li layenê digere, şerê têkvexwarinê têvlêbikin dikin, bi vê yekê mirovahî, ji bo ji binî ve borandina çewtiya xwe armanc dike.
Di sedsalên 19. û 20. de; karkeran, yên tên mêjtin, gelên bindestmêtngeh ji bo azadî û sosyalîzmê şerên dijwar kirin, li guherînên girîng
yên şoreşger îmze danîn. Sedsala 19. bi temamî ne serdema burjuvazî ne ya proleterya ye. Pêvajoya derketina serdema şoreşên burjûva û derbasbû-
na şoreşên proleterya ye. Komîna Parîsê ku di çaryeka paşî ya sedsala 19.

de pêkhat, hemû bar, tengasî û pirsgirêkên vê derbasbûnê hilgirtibû û ancax
71 roj karibû bijî.
Sedsala 20. serdema şoreşên proleter e. Çîna karker ya dinyayê û gelên mêtingeh-bindest rabûn serxwe. Ligel çîna karker ya Awrûpa gelên Rojhilat jî di lêgera azadî û sosyalîzmê de bûn. Bitûnê van dînamîkan, ders derxistina ji sedsala 19. û bi taybetî ji Komîna Parîsê re, di sîstema emperyalîst-kapîtalîst de baxorên cidî vekirin, cîh bi cîh derbên mirinak lê
dan. Lê belê dînamîken şoreşger û pêla şoreşê yên sedsala 20. di çapa dinyayê de wekî paşîn neborî. Di serî de YKSS rejimên sosyalîst, di dewreyek
geşedanê ya xuya de xitimîn û ruxuyan.
Doktrîna lîberal pirsgirêka azadiyê di çarçeweya dewletê de anî holê, raberî vê, Marksîzmê heman pirsgirêk wekî dewleta ku nedewlet bi perspektîfa
dewleta derbasbûnê ango bi asoyeke firehtir hilda dest. Lê belê rejimên sosyalîst; ya di teoriyê de hatibû pêşdîtin, derbasbûna ji dewletê berbi bêdewletiyê pêk neanîn, li şûna ku gav bi gav vemire, dijê vê bihêz bû, ji ber vê jî belaya bîrokrasiyê bû sedema ruxînê. Serdestiya gel di pêvajoyê de veguherî îqtîdara partiyê, kulta siyasî ya partîserdest nehat borîn.
Şoreşa Îlonê ku navendîbûna Rojava (Awrûpa) borand, hewleke mezintirîn
ya Rojhilatê bû, lê belê bigiştî dînamîka şoreşger ya sedsala 20., bi taybetî YKSS di pêvajoyê de modernîzma Rojava û siyaseta aborî ya pêşketinî neborand. Sosyalîzma reel, kaniya enerjiyê ya fosîl ku yekîneya enerjiyê ya şaristaniya senayî ya kapîtalîst bû, neborand, ji dewreke geşe-

102
danê şûnde ev jî bû sedemek din ya xitimîna wê. Li ser kaniyên enerjiyê yên fosîl, merhela kominîzmê ya jêr hat avakirin ancax nikaribû derbasî civaka kominîst ya ku çand serdest û bêdewlet ku dewlemendiyek pir pêwist bibîne, bibe. Derbasnebû!
Tevgera kominîst ya sedsala 20. gava ku bi rê ket “her tişt bo mirov” got; lê belê di rejimên sosoyalîst de, kes û azadiya kes, di bin giraniya dewleta bihêz û civakîbûn, kolektivîzmê de hat ji bîr kirin, hat pelçiqandin.
Biyanîbûna kes, ji rejima xwe ya sosyalîst re kûr bû, rejim bêxwedî-bêparastin ma û ruxiya. Çimkî her veguherek civakî; pêşveçûna teknîk, bi qanda ku pirsgirêkek aborî û siyasî ye, pirgirekek derûnî, zîhnî ye jî. Veguherîn
û pêşveçûn tenê bi regezek daringî ve sînorkirî bûya Swed, Swîsre, Belçîka bi xwekuştinan, di dinyayê de, herî li pêş cîh nedigirtin. Neafirandina
kesayetiyek ku wekî derûnî û azad dewlemend, sedemek ruxandinê ya din bû.
Sazûmana mêjtin û milkiyeta kesî ku rehên wê digihîje çend hezar salan û aîdîyet, hînbûnî, girêdayina daringî, çandî, siyasî afirandibû bi cidî-yet hat qelaştin lê ji bin ve û wekî paşîn nehat borîn. Ev vatinî ma li ser milên dînamîkên şoreşger û şoreşên sedsala 21.
Ji hevdana vana giştî, pêla şorêşê ya sedsala 20. ji par re vekişiya, dî-namîkên ku hilberînên vê pêlê bûn xitimîn an jî belav bûn û bi layenekî diyarker ji nû ve veguherîn kapîtalîzmê. Ev pêvajo didome. Dînamîka şoreşger
ya sesala 20. di çapa dinyayê de, ji ber ku şaristaniya senayî ya kapîtalîst-emperyalîzmê

û tevna wê ya modernîst ku nikaribû biborîne ji nû
ve veguherî wê. Di vê pêvajoyê de tevgera kominîst jî wekî diyarker veguherî
tevgerek nû ya sosyal-demokrat û vediguhere.
Di salên du hezaran de tevgera kominîst ya dinyayê, divê berê, bi qetandinek
cidî jê xelasbûna siyasî ya sedsala 20. bike armanc. Di dîrokê de
her demê qetandin û berdewamî li rex hev geş bûne. Her qetandinek, di heman demê de wekî pirek navbera rabirdû û dahatû timdomiyê jî têkveduxwe.
Tevgera kominîst îro; Marksîzm û teorîya zanistî ya sosyalîzmê û
rihê şoreşger ku êrîşî asîmanan dikir ya sedsala 20. divê bingeh bigre û timdomiyê; lê belê divê ji bernameya siyasî ya xwerûyî sedsala 20. terza tekoşîna pratîk û girîngtirîn jî, bi avahiya kominîst ya kevn ku veguheriye tevgerek sosoyal demokrat ya nû ya mîna bi layenê diyarker neteweperwerîya
çep an jî çepê lîberal re divê bendên xwe bi qetîne û veqetandinê

pêk bîne. Tevgera kominîst ya sedsala 21. bi vê qetîn û timdomiyê dê ji nû ve teşe bigre, divê teşe bigre. Em kominîstên Bakurê Kurdistanê qetîn û
timdomiyê di vê bitûniyê de, dixwazin geş bikin.
Di sedala 21. de, di lêgerîna sosyalîzmê de, li ser bingeha Marksîzm û sosyalîzma zanistî, nûjenkirina hilberîna teoriyê ji bo çareserkirina gava yekemîn e; gava duyemîn bi têkvexwarinek ku bi esasî çalakiya yekser, tekoşîna
pratîk ku dê tevlê bikê ve, dê pêk were. Bi taybetî pêkanîna bitûnî-kirina organîk ya kesayetiya azad û civakîbûn û kolektivîzmê, divê bibe

armancek tekoşîna piratîk û teorîk. Îro, gava ku em ji nû ve berê xwe bidin şerê sosyalîzmê, divê berê mirov ji ziliyeta xwe rizgar bibe. Divê bête zanîn ku rizgarîya mirov, ne tenê kar, xwarin, sitirîn (ku tenê ev bûna, sosyalîzma
reel ew pêk anîbûn) e, azadî, estetîk, dewlemendiya derûnî hwd.
divê bi zanebûna ku bêtir tiştan têkveduxwe, şer bête geş kirin. Azadbûna mirov, berê borandina hesta xwedî derketina milkiyeta kesî û ji ber vê borandina
ji xwe re biyanîbûn, divê were heş.
Dijberîya kapîtalîzmê îro, li gora sedsala 20. di çapa dinyayê de
bihêztir û ji kûr ve geş dibe. Çi rêxistinên sivîl yên civakê ku tenê li dijî encamên kapîtalîzmê, dînamîkên forumên civakî, çi jî ligel dijî encamên wê dînamîkên kominîst, şoreşger ku li li dijî wê bixwe ne, herkes bi teşeyekê
raberî kapîtaîzmê helwestekê nîşan dide. Di serî de çîna karker, tebeqe û çînên di bin zextê de ne û dipelçiqin, her avahî û herkek siyasî ya muxalîf, bere bere di eniyek dijberî kapîtalîzmê de dibin yek. Kapîtalîzm, di dîroka xwe de, ti caran ewqas kûr û tazî nehatibû lêpirsîn.
Li dijî îmkanên ku makînebûnê di hilberînê de, bidest xistiye; betaliya ku wekî felaketekê mezin dibe û bîhntengiya ku diafirîne; hawara kedkarên
zîreetê ya li dijî siyaseta wêranker ya tekelên zîreetê; dînamîkên ku xwecîh têkvexwarinê tevlê dikin yên li dijî dorpêçandina çand û meta yên emperyalîst; lêgerîna rizgarîya civakî yên gelên Asya, Afrîka ya sedsala 21. ku di sedsala 20. zincîra mêtingehkarîya emperyalîst şikandibûn; rêxistinên
sivîl yên civakî ku tenê bi hin reformên civakî di lêgerîna wechekî civakî bidin kapîtalîzma dirinde de ne; forûmên civakî û nîhayet tevgera

kominîst ya dinyayê ku li dijî kapîtalîzmê, bi alternatîfa ji nû ve sosyalîzmê,
têkoşînê geş dike…
Ji van hemû dînamîkan heryek ji alî perspektîfa xwe ve, dixwazin têkvexwarinê tevlî dîroka ji nû ve li layenê digere, bikin. Hawirparêz,
104
xwecîhvan, reformvan, ji alîgirîya antî-kapîtalîst; heta bi yên ku dewletnetewê
weke qurbana kûrewîbûnê dibînin yên antî-kapîtalîst û ya paşîn heta ku kominîstên dixwazin kapîtalîzmê ji bingeh ve biborin, tekoşînek ku ciyawaziyên
dewlemend têkvedixwun ya antî-kapîtalîst geş dibe. Mexdûrên sazûmana kapîtalîst, karkerên ku tên mêjtin, bêkar, bindest, jin ango kirdeyên
rasteqînî, girseyên fireh yên gel yê dîroka ku ji nû ve li layenê digere, li kapîtalîzmê gef xwarin wêdetir, wekî aktorên siyasî, ji bona borandina wê, ji bo ji nû ve cîh girtinê, xwe amade dikin. Ku mirovahî ji kansera civakî ku jê re kapîtalîzm tê gotin, dê rizgar bibe; dînamîkên bingehîn yên vê tekoşînê, bi giştî yên dixebitin, bi taybetî jî xebatkarên bimûçe, divê bi heşê şoreşger û navgînên şoreşger ve hevûdin dîtinê pêk bînin.
Stratejiyên emperyalîst, bi taybetî îdeolojiyên burjûvazî, di van salên paşî de; “tûşîhevbûnên navbera şaristaniyan?, “paşiya dîrokê”, “paşiya îdeolojiyan” û tez an îdeayên “împeretoriyê” pêş ve ajotin. Hêna ev tez an jî îdîayên ku di welîdînê de ruxiyane, di armanca şewişandina heş û hedefê de ne. Di tevereya neteweperwerî û ol de dixwazin gel û civak di qirika hev kevin, şerên çînan yên antî-emperyalîst, antî-kapîtalîst, armanc dikin ku binsî bikin, biçewisînin. Tevgera kominîst ya dinyayê, li hemberî vê êrîşa îdeolojîk ya pirlayen, divê gelan, girseyên tên mêjtin, çewisîn, bi

îdeolojî û siyaseta şoreşger ve bikokîne û divê biheşkirinê geş bike.
Di hedefa veguherîna şoreşger de, bi qanda rexnekirin û têgihîştin, biş-kaftina îqtîdarê, heşê serdestan, serdestiya heş ya îdeolojiyê, bişkaftina heşê bindestan jî jêneger dibe. Her pêvajoyek kedê û heşê her kedkarî ji ber xwe ve nabe şoreşger; berjewendiyên rojane, berxwedana ji bo berjewendiyên
fîîlî, nayê wateya ku ji bo heşê berxwedêran ji yê serdestan diqete.
Di vê wateyê de tevazuh kirina korelasyona di navbera bona heşê
mirov û xeyala azadiya mirov de, pirsgirêkek ku nebe nabe, ye. Ev, di heman
demê de diyalektîka heşê mirov bûn û heşê çînê ye. Divê fehma ku
tenê ku mirov wekî regezek gerîneka abaorî dibîne, fehma ku pêwendiya mirov ya di pêvajoya hilberînê de wekî diyarkerê hemû girêyên din û aî-dîyetan dibîne, were borandin;ev heş û vîn pêwist e bi hemû navgînên tekoşînê
ji bo girseyên karker û kedkaran re bête birin. Em bi veguhestinek
heş û di nav şer de honandinek ku girê, pêwendî û aîdîyetên netewî, olî, malbatî, xwecîhî û civakî gav bi gav biborîne; aîdîyeta çînî û wekî guncantir
aîdîyeta biratiya kedkariyê derxe pêş ve rû birû ne. Şertê serkeftinê
105
yê yekemîn geşkirina vê haveynkirina heş ya şoreşger e. Şertê serkeftina dînamîka şoreşger ya sedsala 21. yek din jî, bêyî carandina sedsala 20., li dijî sazûmana emperyalîst-kapîtalîst, tekoşîna enternasyonal ya dînamîkên
kominîst, şoreşger, pêşverû yên Rojava-Rojhilat, di senteza tewereyek nû de bête geşkirin e. Rojhilat, li hemberî Rojava bêyî ku xwe bigre û derve bike, divê yekîtiya şer ji nû ve armanc bike. Şoreşa Îlonê, li dijî îdeaya

“Sosyalîzm tenê kare li welatên kapîtalîst yê li pêş ava bibe”, şoreş bi taybetî
ji ragihandina giraniya navenda şoreşên siyasî bo Rojhilat re navendî-
tiya Awrûpa ruxand, gava ku navendîtiya Rojhilat borand, rol û dînamîka Rojhilat ya di şoreşa dinyayê de kêm nexist an jî bêyî ku prîm bide dijberîya
Rojhilat-Rojava, pêk anî. Lenîn, bi Şoreşa İlonê re gava ku navendîtiya Rojava borand, berî neda siyaset û îdeolojiyek ku navendîtiya Rojhilat biafirîne û Rojhilat bipîrozîne. Dijê vê bi destên dînamîkên şoreşger yên Rojhilat û Rojava girt û kêlûnbûna wan armanc kir. Ev nêzîkahiya Lenîn, ji bo me kominîstên Kurdistanê ku em perspektîfa ji xwecihî gerdûnîbûnê bingeh digrin re, îro jî roniyê dide.

PARTÎYA KOMİNÎST YA DİNYAYÊ

Di dema Marks-Engels de giraniya navendiya enternasyonala Kominîst (Partiya Kominîst ya Dinyayê) Awrûpa bû, dikare bête gotin ku enternasyonala
kominîst bi navendiya Awrûpa welidî û teşe girt. Ligel Şoreşa Îlonê û YKSS re, giraniya navendî ya enternasyonala Kominîst derbasî Rûsya bû. Partiya Kominîst ya Çînê di serokatiya Mao de, di pêvajoyê de berî da afirandina
navendek cuda; qismen akam kiribe jî heqîqeta enternasyonala
sêyemîn ya bi navenda PKYS, bi temamî neborand. Çalakiya enternasyonala
IV. ya Troçkîst, lêgera navenda cuda bû; û wekî din jî bêtirîn xwedî
tevna navendî ya Awrûpayê bû. Li Amerîkaya Latîn, bi taybetî di serê salên 1960 an de tecrûbeyek xwerû ya ku li dijî enternasyonala navend ya
Troçkîst, PKÇ, PKYS hat jîyîn, di salên pey re, herçend partiyên kominîst

yên li vê parzemînê, berê xwe dabin enternasyonala III. ya di bin akama PKYS jî helwesta xwe ya xwerû parast.

Doza kominîzmê, tenê ne pirsgirêka karkeran e, bi karker, kedkaran, bi gişt̂ gel, ya gelan e. Weke din serê salên du hezaran de gava li dinyayê bête nêrîn, êdî, ligel kapîtalîzmê, hebûna çîna karker ya li hemû parzemînan bûye rastiyek. Ji ber vê, hebûna partiyên kominîst, êdî tenê, ne rastiya

Awrûpaya Rojhilat an jî ya Bakurî ye, rastiya her enternasyonalek li dinyayê

ye. Wekî hilberîna tevgera kominîst ya sedsala 20. hevdanek girtirîn

pêk hat. dî tevgera kominîst, bi qanda ku pêwistî bi xwedî tecrûbe, partiyek

komuminîst ya birayê mezin nebîne, bi hevdanek dewlemend re rû

birû ye. şûna têkiliyên partiyên “kak, ku pêşnyaran bikin û bi destên partiyên

ciwan an jî biçûk bigirin, divê têkiliyên enternasyonalî yên spartî yekîtiya çalakiyan û guhertina tecrûbe, dîtinên dewlemend yên birayên wekhev, lê belê bi rastî jî wekhev, bête danîn.

Di serê sedsala 21. de bi navenda partiya kominîst X an jî Y, enternasyonala

kominîst nayê ava kirin, ku ava bibe jî nikare bibe karîkatorê enternasyonala

ÎÎÎ. ya rabidû jî. Partiyên kominîst yên roja me, fikren ango wekî

îdeolojîk teorîk cîhanî, gerdûnî lê belê wekî nuxteya rabûnê li ser zemîna xwecihî-welatî-herêmî, ji nû ve divê werin ava kirin. Bi vî awayî, li şûna navenda ku ji alî partiya x, y an jî ji alî tevgera kominîst ya li erdnîgarya x, y ve hatiye ava kirin û enternasyonala ku li dora vê navendê hatibe te-

şekirin û partiyên ku tenê seksiyonên wê yên jêr in, divê partiyek kominîst
ya dinyayê ji nû ve bête armanc kirin da ku herkes herkê bidiyê û karibe weke parçeyek wê ya organîk tevbigere.
Wekî encam, ji ber hevdana têkiliyên kişwerê yên îdeolojîk, siyasî, çandî û aborî ku enternasyonalên I., II. û III. li ser van teşe girtiye mezin bûne, em wan rexne nakin, fam dikin; têdigihên lê di şertên guherî de em bawer dikin ji nû ve û bi heman awayî dê neyên carandin.
Wekî Tevgera kominîst ya Kurdistan; ji bo afirandina enternasyonalek nû, em tevgera kominîst ya dinyayê gazî têkoşînê dikin, jo bo hewl û têkoşînên di vê derbarê de werin hevparkirin û bi taybetî her partiyek an hêzek kominîst li erdnîgar û herêma xwecîh ku lê nîştecîh e, di vê layenê de gavên pratîk yên daringî bavêjin û rengên xwe ragihînin Partiya Kominîst
ya Dinyayê. Ewqas ku, em di zemîna Marksîzmê de çem û robarên xwe yên cihkî (ciyawaziyên xwe) ragihînin okyanûsa partiya kominîst ya dinyayê û yekîtiya organîk armanc bikin.
Bi rêjeya ku ev armanc pêk were, ji nû ve ji bo Marksîzmê hem tevlêbûnek afrîner bête geş kirin hem jî di gihîştina sentezekê de rê were stantin. Ancax wê demê dê hem parzeyek Rojhilat ya cidî li Marksîzmê bête dan hem jî li şûna ku Lenînîzm û Şoreşa Îlonê ku di senteza Rojhilat û Rojava de gavek mezin e, bête carandin, dê ji nû ve hilberandin û na-
107
vendîtiya Awrûpa wekî paşîn dê bête ruxandin. Bi rêjeya ku di vî derbarî de serkeftin pêk were, dê karibe, ji bo doza Marksîzmê û kominîzmê ji okyanûsa (senteza) mezin re xwecîhî, herêmî, parzemînî ku pêşengên mî-na Che, Mao, Troçky, R. Luxsemburg, Gramscî di nav de bûn, dê karibe were raguhestin. Mîna ku hinek ji vê, hinek ji wê ku ji yekîtiya eklektîk an

jî hevdanek arîtmetîk wêdetir, dê karibe bigihîje sentezeke (yekîtiyek organîk)
din.
Tevgera Kominîst ya Kurdistan, di rîya ku dere Partiya Kominîst ya Dinyayê
de, li her çar perçeyên Kurdistanê ji bo yekîtiya tevgera Kominîst her gavek bête avêtin, bawer dike ku dê di rîya hevkarî û yekîtiya Tevgera Kominîstên
Rojhilata Navîn de, dê hewlek be.
Em wekî Tevgera Kominîst ya Kurdistan; ji nû ve di afirandina Marksîzm-Lenînîzmê
de, bi şirovekirina Hindî, İtalî, Amerîka Latînî, Tirkî, Erebî
re di nava hevakam û têkilî de şirovekirina Kurdî / Kurdistanî, di serî de bi vê danezanê em armanc dikin. Ev, senteza ku di qada dinyayê de tê armanc
kirin ji erdnîgara Kurdistanê tevlêbûnek xwerû ye.
Wekî Tevgera Kominîst ya Kurdistan, girêdayî vê pirsgirêkê; em bang dikin ku Lenîn çawa nêzîkahî li Marx / Marxîzmê kiriye, Tevgera Kominîst ya Dinyayê jî divê wisa nêzî Lenîn / Lenînîzmê bibe.
Di ser Şoreşa Îlonê û mirina Lenîn re nêzî sed sal dem derbas nû. Piştî Lenîn, bi taybetî di nîvê duwemîn yê sedsala 20. de çi geş bûn-stewîn? Ku ewana bi kûrahî neyên analîzkirin, bi heman carandina Şoreşa Îlonê û Lenîn
re, nêzîkahiya doxmatîk ya li Marksîzm-Lenînîzmê, nayê borîn. Ma,
hîç tevlêbûnek afrîner li Marksîzm-Lenînîzmê nebû, bû. Lêgerînên Che û yên hevalên wî yên xwerû yên li Amerîka Latînî, xwerûtiya ku Mao di şoreşa
Çînê de pêk anî, felsefa Siyasetê ya ku Gramscî ya xwerû ku ji bo civaka

navend bajêr geş kir hwd. tê zanîn. Ji alî beşdaran ve dikare mînak bêtin zêdekirin; lê belê heqîqeta borîn û borandina hin beşdaran jî heye; hem jî ji beşdarên xwecîhî wêdetir, di serî de di derbarê teorîya rêxistin / rêxistinbûnê de beşdarên gerdûnî wekî diviyahî xwe didin pêş.

Lenîn dehayek siyasetê yê heqîqî bû. Di nêrîna rabirdû û dahatû de, qetandin û timdomiyê wekî parçeyên bitûniyê xistibû dest û bi bitûnî jiyabû.

Lenîn gava ku ji enternasyonala II. rîya xwe cihê kir, qetandin rojane kir û bi hilberînek ji nû ve, bû pira qetandin û timdomiyê. Tevgera Kominîst

ya Dinyayê, li serî di sedsala 21. de; divê, bi hêza xwe ya diyarker ve

108

tevgera Kominîst ya sedsala 20. ku veguhezî tevgerek demokrat ya civakî re, rîya xwe cihê bike û qetandinê pêk bîne û Marksîzmê bingeh bigre û jê re, ji nû ve beşdarîya hilberîner û timdomiyê, pêk bîne. An emê pêk bînin û piştçiyê ango xetên diyar yên sosyalîzma sedsala 21. ji civakê re net, jê famker, bi tarîfek qanekirî û bi giyanekî şoreşger pêşkêş bikin an jî buhrana kapîtalîzmê ku veguhêziye buhrana şaristaniya senanyiyê, dê ligel

xwe, mirovahiyê jî berbi tunebûnê ve bikşîne.

Rêxistinbûna kominîst ya sedsala 20. di çapa dinyayê de bû dînamîka guherînên şoreşger. Lê belê, di serî de partiya Lenîn PKYS, rejimên sosyalîst

ku heman partî û rêxistinan di afirandina wan de rolek diyarker lîstibû, di pêvajoyê de, bi avahiyên xwe; bîrokratîk bûn, mat bûn û veguherîn avahiyên ku xwe dicarînin, îdeaya xwe winda kirin, çilmisîn û ruxiyan. Taybetiyek rêxistinên kominîst yên sedsala 20. ku derket pêş jî ev bû; di pêvajoyê de kêm zêde di hemû partiyên kominîst de navend bû Xweda,

sekreterê giştî derket qata pêxemberiyê. Ligel hin faktorên din, vêya ji alî avahiya hişk ya navendîtî ve hat afirandin. Ev taybetiya ku bi armanca siyasî, îdeolojî, felsefeya kominîst ve ne li hev bû, nehat borîn.

Di rêxistina Kominîst ya sedsala 20. de hevsenga disîplîn û azadiyê, di nav disîplînê de li ser azadiyê hatibû avakirin. Her tişt ji bo mirov û azadiya

mirov hatibû pêkanîn; lê belê di nav sînorên disîplîna rejimên sosyalîst û partiya wê de, azadî qada jîyînê nedît û di pêvajoyê de xeniqî. Bêtirîn disîplîna ku azadî xeniqand jî ji ber ku bê oksîjen ma, ji ber xwe ve ruxiya. Di heqîqetê de jî partî û dewletên sosyalîst yên ku bi disîplînek pola hatibûn honandin ligel artêşa dêw, tora îstixbaratê ya leşkerî û sivîl, ev rejim ji ber xwe ve ruxiyan. Di ruxandinê de ligel hin faktorên din, rola disîplîna ku derveyî bû ya di tevna rêxistinê de jî heye.

Geşedanek hevşib, di xebitîna navendî ya demokratîk ku îro jî di xebitîna rêxistinê de regezek jêneger e, hat jîyîn. Hevsenga demokrasî û navendîtiyê

ji ber ku bi bingeh girtina navendîtiyê damezrîbû; demokrasî, di pêkanîna qada jîyînê de ket zorê û di nav tevna rêxistinê de tim biçûk bû. Tevgera Kominîst ya sedsala 20. û bi taybetî partiya Lenîn, di serî de li rû dinyayê rêxistina herî demokratîk ya dinyayê bû. Partiyên kominîst, bi gotinên “emê bîrokratîk bibin, emê navendîtiyê derxin qata Xwedê, li şûna îqtîdara gel emê ya partiyê damezrînin” hwd. bi rê neketin, lê di pêvajoyê

de wiha bûn! Çima? Tevgera Kominîst ya Dinyayê ya divê pratîk û te-

109

orîya rêxistinbûna sedsala 20. bidarizîne û bersîva wê hilberîne.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan; di serî de modela rêxistinê ya Lenînîst,

rêxistina kominîst ya sedsala 20. fam dike-têdigihîje, lê belê di şertên têne
guhertin yên welêt û dinyayê yên ku geşbûne-guherîne-stewiyane de, diyar
dike ku pêwistiyê bi carandina wê nabîne. Gazî Tevgera Kominîst ya dinyayê dike ku di serî de rêxistina Lenînîst, ji bo ji nû ve bi tevlêbûnek afrîner teorîya kominîst, bête hilberîn. Hîn di şênberiyê de; ne îqtîdara partiyê, ya gel; di xebitîna partiyê de jî têgiha yekser demokrasî û ji qadroyan
wêdetir xebîtîna avahiyê; li şûna ku merkez ji jor ber bi jêr ve xwecîh bibe, navendîbûna xwecihê; li şûna azadiya di nav disîplînê de, di
nav azadiyê de disîplînê û wekî yekîtiya van ya orxanîk ya ne li navendê, li gewdeyê modela gerdûnî rêxistin / rêxistinbûna bi hêz biafirînin, em bi van vatiniyan ve rû bi rû ne.
Lîstika “demokrasî, azadî” ya ku emperyalîzm û sermaye di van salên dawî de bêtirîn serî lê dide ku bête xerakirin; li dijî êrîşên zêdebûyî yên emperyalîzm û sermayeyê, pêwistî ji rêxistinek dînamîk û navendek bihêz re, ji rabidûyê bêtir diviyahî tê dîtin. Navendek bi hêz, lê belê ku vê hêzê di gewdê xwe de sift dike an jî navendek hêza xwe ji wir digre; bihêz lê belê mîna centera Îngilîzî navend ya kurdî ku navendek bihêz î gewde an jî navê temsîl bike; di partiyê de kombûn û hêza siyasî, felsefîk, îdeolojîk ne tenê li navendê, rêxistinek ku karibe bi esasî li gewdê rêxistinê kom bike!
Bi qanda raberî despotiya navendê, sitemkarîya xwecîhî jî karibe bibe bariyer, di gewdê de rêxistinek bi hêz ya kominîst, bêtirîn rêxistina ku nikaribe
afrînerên rêxistinê (ango rêxistinkarên xwe) birêxistin bike û hêsîr bigre û karibe timdomî xwe biborîne!

Ku rêxistin, ji hêlekê ve vîna şoreşger û disîplîn be, berevajî rêxistinbûna kominîst ya sedsala 20. ku di nav disîplînê de azadî bingeh digirt, tevgera
kominîst ya sedsala 21. di nav azadiyê de disîplînê bingeh digre; bi vê yekê disîplînê di xebitîna rêxistinê û avahiya qadroyan de hundirandî û
bixe rewşa tevnê ku disîplînê ji regezek derveyî derbixe, karibe derbixe; navenda ku hat damezrandin, berevajî ceribandina sedsala 20, ku ji jor ber jêr ve birêxistin dibû û paşê xwecihî dibû, xwecihî ji her alî ve gav bi gav ber bi navendê ve mezin bibe (navendî bibe) û li navendê yekîtiya organîk
pêk bîne, ev rêxistina kominîst! Ev rêxistin, bi xêzên xwe yên sereke di nav bitûniyekê de, di gewdeyê de rêxistinek bihêz e.

110

Dİ GUHERÎN-VEGUHERÎNA GELAN/CİVAKAN DE FONKSÎYONA PÎŞE Û WÊJEYÊ

Çand, têgehek gelek fireh e û hemû jîyana mirov ya daringî û derûnî diguncîne. Ji çanda mîmarî heta lixwekirinê, xwarin, gihandina hilberê, ji çanda olî heta siyasetê temamê jîyanê têkveduxwe. Ku çanda siyasetê li der bête hiştin, di qadên çandê yên din de yekser an jî tazî berîpêdana îdeolojiyê nabe. Lê belê neyekser be jî qadek çandê ku têkvexwarinek wê ya felsefî, îdeolojîk nînbe, tune ye
Kesên dibêjin “peyamek îdeolojîk ya pîşe-wêjeyê nîne” di nav çewtiyê de ne. Di dîrokê de hemû hunermend / hunermendên mezin; ji ber ku di şertên ku di nav şer û nakokiyên nav çînan yên kûrbûyî, şerê aborî, civakî, siyasî yên tundbûyî, yên dîrokî û civakî de tevgerîyan û bûne alî, bûne pîşevan, wêjevanên mezin. Gorkî, Tolstoy, V. Hugo, Neruda, Pîcasso,

Cegerxwîn, Nazim, Ruhî Su, Yilmaz Guney hwd. Piraniya van hunermendan
di heman pêvajoyê de (Gorkî, Pîcasso, Nazim, Cegexwîn) karbidestên partiya kominîst ji ber vê jî di siyaseta wê de çalakvan an jî neferên wê bûn. Hemû hunermendên lîberal, neteweperwer an jî kominîst bi navgîna wêjeyê peyamên xwe yên îdeolojîk, siyasî ragihandine gel. Bi hunera xwe propaxandaya şoreşger germ kirine, rengên wê biriqandine û
ragihandine gel.
Pîşe, wêjeyek ku bi temamî ji têkvexwarinek îdeolojîk, siyasî bêpar nîne, nabe. Kesên ku dibêjin bi hunerê, ji ragihandina peyama îdeolojîk, siyasî
"na" û raber derdikevin; di xizmeta sermayê û rejimên wê de helwestek îdeolojîk radixînin û bêîdeolojîbûnê diparêzin. Kesên ku ji hunera civakî dûr ketine, ji rejimên sosyalîst yên kevn re, ji lîderên wê re û bi giştî êrîşî nirxên sosyalîst dikin û bi gotina "binêrin em çawa wana rexne dikin" re peyamê didin sermayê û rejimên wê.
Di serî de şoreşa burjuva ya Fransiz ya 1789 û Şoreşa Îlonê ya Sosyalîst ya 1917 an, di hemû şoreşên sereke de; pîşe-wêje, felsefe û siyaset raberhev,
akam li hevûdin kirine û heta bi hevûdin xwedî kirinê geş bûne.
Ango ji hev neqetandî ne, hevderbasbûyî ne. Ronesans-reform-humanîzma
ku ji sedsala 14. pê ve geş bûye û ronîbûna sedsala 18. ya paşî şoreşa burjuva a 1789…Ango şoreşa 1789 ya burjuva, bi zembîlê ji asîmanan daneket. Ku fonksiyona di pîşe, wêje û felsefe, di amade kirina guherîn-
111
veguherîna gel û civakan bi bêhnfirehî nebûna; şoreşên siyasî, civakî ku

di guherîn-veguherînê de vîraja tîj temsîl dike, dê pêk nehata. Ger ronîbûyîna sedsala 18., ger di salên dirêj de felsefeya wêje, pîşeya anarşîst, humanîst,
şoreşger ya Rûs ku ji bo guherînê gel amadekirina, fonksiyona
xwe nekiribûna piştek, Şoreşa Îlonê ya sala 1917 pêk nedihat.
Di amadekirina gelan, civakan ya dûvûdirêj de fonksiyona pîşe-wêjeyê diyarker e, bi vegotinek din ji disîplîna siyasetê bi akamtir e; lê di şoreşguherîna civakî-siyasî ya radîkal de ku vîraja tîj temsîl dike, fonksiyona siyasetê
diyarker e. Pîşe, wêje û siyaset ligel ku hevderbaskar in û fonksiyonên wan î wiha yên xwerû jî hene.
Di dîrokê de têkiliya siyasetê û rewşenbîr tim bûye pirsgirêk. Ev pirsgirêk ji kesan bêtir, ji tevna xwe û ya siyaset û pîşeyê tê. Wekî dînamîka pîşe-wêjeyê rewşenbîr, ger ji ber pêwistiya qadên wan yên xwerû û ger ji ber avahiya xwe ya mubtelayê azadiyê û çi ji ber disîplîn û sînorkirina ku ji avahiya siyasetê tê û pirsgirêkên din… Bi berçavka siyasetê ji hilberîna rewşenbîran re sînordanîn, hela li ser navê partiyê hilberîna pîşeyî-wêjeyî reçete pêşkêşî kirin, dê qada hilberînê ya xweser ya rewşenbîr teng bike û
ev nêzîkahî çewt e. Berevacî vê, divê siyaset jî li hember hilberîna hunermend,
xwedî azadiya ku karibe bêje rast e an çewt e.
Ravekirina rewşenbîr zor e. Xwende, bijîjkê bi destûrname, parêzer heta bûyîna bi bernavê profesorî û rewşenbîrbûnî tiştên ji hev cuda ne. Kirpandina rewşenbîrbûn mirovê şer bûnê ye jî têr nake. Bi bernavên akademîsyen,
profesor mirovê zanistê ku di xizmeta Hîtler, Musolînî, Kenan
Evren, Bush, Ehmedînejad de şer kirine gelek in. Ji vanan re, gotina rew-

şenbîrên burjuvazî jî bi pirsgirêk e. Hebe nebe vana reşenbîrên kevneperst
in. Ku ji vanan re rewşenbîr bête gotin ji Tolstoy, Neruda, Nazim, Cegerxwîn
hwd. ku li lehengên bêhêjmar yên di vê qadê de, dê neheqî bête kirin.
Emê neheqiyê li Feqiyê Teyran jî bikin ku ew hê di sedsala 14. de digot:
Ez dengbêj im hatim vira
Heta hebin dengê mîra
Ezê binivîsim ser kaxeda
Ne diçim dêra ne mizgefta.
Di rewşek dîrokî de ku zanîngeh bere bere dibin marketên mezintirîn, mirovên zanistê bere bere dibin karmendên firotina agahiyê, afrînera di 112
warê pîşe û wêjeyê de dibe parçeyek ji çanda xeridandinê û bihûdek bazirganî
qezenc kiriye; berhemên ku sponsorîya mezringehên çandê yên
grûbên sermayê yên mezin ku nestînin, nikarin xwe ragihînin gel û di civakê
de dînamîkên pîşe-wêje yên pêşverû, şoreşger, civakî şerê jîyînê didin.
Tevgera Kominîst ya Kurdistan, di van mercan de dînamîkên pîşeyê û herkesê ku di vê qadê de bi hestên berpirsiyar tevdigerin:
Li dijî dorpêçkirina pîşe-wêjeya spartî sponsorîya grûbên sermayê û pî-şeya ku bi patenta dewletê, helwestê nîşan bidin,
Nêrîna “pîşe bo pîşe” bête redkirin û bo pîşeyê ji nû ve parzeyek pêşverû, şoreşger bête pêkanîn,
Ji bo di pîşe-wêjeyê de spartî senteza romantîzma şoreşger heş û hest, ferisandina rexneyî û hêza xeyalê, ji nû ve bête geş kirin,
Bi qanda ku li dijî rejimê, li dijî sazûmana mêtinger ya kapîtalîst jî nav

li karker, xort, jinên kedkar û gundiyan, bête dayîn, ji dirûşman wêdetir vê
nav têdanê ji bo bi naverokek pîşeyî û ji kûr ve di pîşeya civakî de bête xebitîn, xebat bête dayîn,
Li şûna ku hilberîna xwe di jiyana jîndar de pêk bîne, li dijî wêjeya postmodern ku spartî “talan kirina arşîvan” e helwest bête nîşandan, ji bo
geş kirin û bihêzkirina nifşa rewşenbîr ya ku bi karker û kedkaran re çarenûsa
xwe kiriye yek,
Di rewşa Kurdistanê de ji bo, di rîya ku Baba Tahir, F. Teyran, E. Xanî, Qedrîcan, Y. Guney û Cegerxwîn vekirine de bête meşîn, ji bo îdealên wan yên azadiya netewî û sosyalîzmê bi têkvexwarinek hemdem di pîşe, wêjeyê de ji nû ve bête hundirandin GAZİ DÎKE.
MEZOPOTAMYA, ŞARİSTANİYA ROJHİLAT-ROJAVA
Û LÊGERÎNA SENTEZEK NÛ
Dergûşa çanda dinyayê û xaka baweriyên Xwedayî yên pêşîn, lê serî rakirine, bigiştî Rojhilata Mezin, bi taybetî “Hîlala berdar” e. Bikaranîna xakê, gavên hilberîna çandiniyê yên pêşîn ji alî gelê Mezopotamya, wekî guncantirîn gelên Rojhilat in. Mezopotamya “Hîlala Berdar” dergûşa şaristaniyê
ya dinyayê ya pêşîn e, erdnîgara ku zanist û çandê pêşîn lê aj daye
ye.
Xeleka yekemîn ya meşa şaristaniyê ya mirovahiyê, Mezopotamya-Mi-113
sira kevnar; gavek ji par î wê xeleka duyemîn Hind-Çîn û Maya-Aztek a antîk; û xeleka sêyemîn jî Yunan-Roma temsîl dike. Derketina ber ronahiyê

ya şaristaniya Yunan-Roma ya kevnar, piştî şaristaniya MezopotamyaMisir
ya kevnar e. Ku bi nêrînek din bête nêrîn; şaristaniya mak Mezopotamya-Misir;
şaristaniya Rojhilata Mezin û şaristaniya Başûrî, Mezopotamya-Misir, Hind-Çîn, Maya-Aztek; şaristaniya Rojava ya kevnar jî GrekRoma nîşan dike. Hem şaristaniya Rojhilata Mezin / Başûrî û hem jî ya Rojava berê ji Mezopotamya-Misrê akamê digre, jê xwedî dibe, paşê jî di gava duwemîn de li hev akam kirine û ava bûne. Hewza Dîcle-Firat û hewza Deryaspî ku Nîl diherkiyê, di dîrokê de di navbera gelan / civakan de ji bo çand û sentezê bûye mîhraqên hevpar yên girîng. Di dîrokê de Mezopotamya û Misir bi ajên pêşîn yên çand û zanistê ve; Yunan, bi xebata
felsefe û zanist ya pêşîn ve; Roma, bêtirîn bi pîşeya şer, dad û endezyarî têne bibîranîn. Rojavaya nûjen û bi giştî şaristaniya senayî ya kapîtalîst tiştê ku bi esasî lê digerîya, li Romayê dît. Û navendbûyîna Rojava ya şaristaniya senayiyê û disîplîna modernîst jî ligel faktorên din, ji vir tên. Jixwe çi hatiye serê mirov; yekemîn bi derbasbûna milkiyeta arzî, duyemîn
jî ji ber ku endezyarîya Romayê bûye disîplîna sereke.
Çand û şaristanî, di dîrokê de hevderbas in, ketine nav hev. Ku bête nêrîn, yek jê jî ne homojen in, ne safî ne, tevna giştan ya resen ji derbasbûnên
hevraber ciyawaz bûne, ji yek pareyiyê derketine û dureh bûne.
Gava pêşîn ya vê derbasbûnê an jî sentezbûnê; berêpêşîn di navbera Mezopotamya-Misir
de û ji şopandinek ji par re di navbera MezopotamyaMisir-Enetolya-Hind-Çîn

(ango Rojhilata Mezin) pêk hatiye, bi derbasbûnên
hevraber ve akam li hev kirine, hev ava kirine û geş bûne.
Sentezbûyina mezin ya pêşîn ya dîrokê di navbera felsefeya Yunan-Roma ya klasîk û zanist û çanda Mezopotamya-Misir (ango Rojhilat û Rojava) de, bi qederek şûn de pêk hatiye. Ev gav, wekî bi giştî hevdîtina pêşîn ya cidî ya di navbera çanda Rojhilat û felsefeya Rojava de ye. Di vê hedî-tinê de, zemîna mader bi taybetî Mezopotamya-Misir, bi giştî jî ji şaristaniya
Rojhilat ya mezin pêk tê. Şaristaniya Yunan-Roma ya antîk ku jê xwedî bû û li ser bilind bû şaristaniya Rojhilat ya mezin e. Disîplîna dîrokê ya navend Awrûpa, ligel ku Yunan-Roma ya kevnar derdixe pêş, Mezopotamya
kevnar, Misir û Rojhilatê Mezin jî bi sîstem paşguh dike.
Êdî Awrûpa û Asya (bi taybetî jî Rojhilata Navîn) ango; li Mezopotama-

Pers-Komagene-Misir-Enetolya-Yunan-Romayê çand, zanist û felsefe hevderbas
e û bi têketinên hevraber ve hevûdin temam kirine û ava kirine. Di
nav şaristaniya Yunan de şaristaniya Mezopotamya-Pers de şaristaniya Yunan;
di nav şaristaniya Romayê de şaristaniya Misir, Enetolya; di nav şaristaniya
Misir-Enetolyayê de jî şaristaniya Romayê heye. Wekî guncantirîn di qada çand, zanist, felsefeyê de Rojava, Rojhilatê; Rojhilat jî Rojavayê têkveduxwe. Çand û şaristanî, di dîrokê de tim hevderbas bûne. Wekî împeretorîya
Romayê ku nimûneyek xwerû ye, li Asyayê bûye Rojhilatî. Ol jî
li dervayî vê hevderbasbûnê nemaye.

Wekî sê olên semawî yên mezin; Mûsewîtî, İsewîtî, İslamiyet jî li “Hî-lala Berdar” welidîn, geş bûn û wekî dewama havûdin derbasî nav hev bûn û hersê jî ji Zerdeştiyê xwedî bûn ku ew pêşîn derbasbûna yek Xwedayiyê
temsîl dike.
Ciyawazî an jî dijberîya Rojhilat-Rojava; milkiyeta arzî, çîn, mêjtin, wekwekî navgîna çewsandinê dewlet û ji ber vê, siyaset gava derket ser dika dîrokê, paralelî vê bi zanebûn hatine geş kirin. Hêna jî tên geş kirin. Wekî kevirê kîlometreyê yê diyar, di dîrokê de dijberîya Rojhilat-Rojava; bi şerên Med (Yunan-Pers), ciyawaziya Xiristiyan-İslamê, ruxîna împeretorîya
Romayê û qedana serdema navîn, mêtingehkarîya ku Rojava geş
kir û paşîn jî bi armanca mêjtin û serdestiyê ku Rojavaya emperyalîst-kapîtalîst
bi Rojhilat kir “yê din” re gihîşt nişûvê.
Tevgera Kominîst ya Kurdistan: binî xêz dike ku di serê sedsala 21. de dîrok û şaristanî ji nû ve di nav lêgerîna layenê de ye û dînamîkên ku alî-girên guherîna şoreşger in, gazî li wan dike ku tekoşîna ku têkvexwarine ji
nû ve tevlî dîrok û şaristaniyê bikin, bidin. Fikra ku şaristaniyên RojhilatRojava
“dijber in” û îdeaya “şerê navbera şaristaniyan” ku pirsgirêka şaristaniyan wekî hilberîna heşê dîrokê yê şewş û hilberîna propaxandaya xapînok ku bi navend girtina Awrûpa ve teşe girtiye, dibîne û red dike, diyar dike ku şerê eslî şerê di navbera kapîtalîzm û mirovahiyê de ye. İdeaya qelemşorên emperyalîzmê yên îro ku dibêjin “şaristanî şer dikin û tu caran
dê li hev neyên” diyar dike ku bi armanca, bi giştî Rojhilat, bi taybetî

civakên İslamê ji nû ve “yê din” kirin re, ji bo şaşkirina hedefa tekoşîna navbera çînan (serdest-bindest) ku di serê sedsala 21. de bi kûrahî ji nû ve
haveyn digre re, tê kirin. Û vê hedef şewişandinê ku regeza wê ya mader navendîtiya Rojava (daringîtî, kestî, nîjada spî û xiristiyanî) bi hemû la-
115
yenên wê ve red dike, li nik girseyan teşhîr dike û ya ku wekî alternatîf dertê pêş, dîtina Rojhilatîyî, Asyatî, İslamiyetî jî red dike
Zihniyeta dagirker, mêtingehkar, wekî tiştekî tim bi çavên ku dê lê bête gerîn, dê bête çavdêrî kirin, jê bête xwedîbûn û bête mêjtin li Rojhilat (Başûr) nêrî û misyona “li Rojhilat damezrîner” li xwe bar kir. Berêpêşîn em vê red dikin. Di dîrokê de, bi taybetî wekî dîroka nêz di sedsala 20. de gelên Rojhilat û Başûr îspat kirin ku ew kirdeyên dîroka xwe ne. Di nav şerê li dijî emperyalîzmê de îspat kirin ku karin xwe damezrînin, ji nû ve xwe amade dikin ku îspat bikin. Tevgera Kominîst ya Kurdistan di teko-şîna şaristaniyek nû de, binê rola gelên / civakên Rojhilat û Rojava bi hevdanên
hevraber, xêz dike, di vê layenê de gazî tekoşînê dike.
Tevgera Kominîst ya Kurdistan; bawer dike ku, ligel şaristaniya senayî ya kapitalîst, dê karibe navendîtiya Rojava jî were borîn ji gelek layenan ve û bi borînên azad re, dê karibe sentezek nû bête bidest xistin û ev senteza
nû bi şaristaniya mader re di aştiyê de kare pêk were û senteza Rojhilat-Rojava
kare geş bibe. Diyar dike ku rîya dere senteza nû, bi Şoreşên
Îlonê yên rê li ber sosyalîzmê veke, dê karibe pêk were û di vê pêvajoyê de bi şaristaniya kominîst ya çand serdest dê karibe kûr bibe.
Kurd (mîna Ermenî, Ereb, Eşûran) ji gelên xwecîh yên Mezopotamya

ye. Gelê Kurd û di pêvajoya afirîna Gelê Kurd de gelên ku hevraber akam li hev kirine, dînamîkek afrîner yê şaristaniya Mezopotamya ye. Bi taybetî Hurî; bi sedema xebitîna pira çandê, di dîrokê de xwedî cihekî girîng e. Di ragihandina çanda Mezopotamya bo civakên Hitît, Filîstîn û Fenîkîyan û ji ber vê civaka Yunan û dinya Rojava, rolek girîng lîst.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan ku reha xwe ya dîrokî li aliyekî, li welatê me digihîne demara welatperwer-kedkar-sosyalîst ku ji Feqiyê Teyran heta Cegerxwîn dirêj dibe, ji alî din ve dispêre teorîya Marksîzmê û soyalîzma

zanistê, bi veguherîna şoreşger ya li dinyayê û di nav têkiliyên organîk yên pê re, li Kurdistanê guherînê armanc dike.

116

HERÊMA ME

Lİ KURDİSTANÊ Û Lİ ROJHİLATA NAVÎN

SÎNOR, Lİ DİJÎ VÎNA GELAN HAT DİYAR KİRİN

Kurdistan bi peymana Qesra-Şêrîn, berê di navbera İran û Osmaniyan de, bû du beşan. Piştî vê dabeşbûna pêşîn ya di dîrokê de, di dû şerê parkirinê

yê emperyalîst yê 1. de, bû çar beşan. Ligel Fransa û İngilîstan dewletên herêmê yên mêtingehkar / İlheqkar berpirsiyarên vê dabeşkirina duyemîn

in.

Dewletên İngilîstan û Fransa yên emperyalîst ne tenê Kurdistan, bi giştî Rojhilatanavîn bi taybetî li erdnîgara Ereban, vîna gelan bi hîç hesibandin, bi temamî li gorî berjewendiyên xwe û hevsengên hêzê, sînor li ser nex-şeyê, adetî bi cedwel xêz kirin. Bi vê yekê ciyawaziyên etnîkî û olî yên navbera gelan, civakan ku pêwist bê dîtin ji bo karibin weke nakokiyê bikar

bînin, zemîn amade kirin. Ligel ku welatê Kurdistan bû çar parçeyan, li erdnîgara Ereban, girêdayî xwe, li dora 20 dewletên ji hevkariyê wêdetir yên kukla ava kirin. Emperyalîzmê bi vê yekê xwest ku mafê gelan yên ku 117
karibin dîroka xwe bixwe pêk bînin, ji dest wan girt û hêna jî di vê yekê de israr dike.
Di şerê parkirinê yê emperyalîst yê. II. de; Komara Gel ya Azerbêcan û Komara Kurd ya Mehabad bi desteka artêşa Sor hat damezrandin. Piştî kuYDA û Îngilîstanê ultîmatom dan, Artêşa Sor vekişiya û herdu Komar jî ruxiyan. Di vê ruxînê de berpirsiyarên esil emperyalîzma Îngilîstan û DYA ye. Gunehên emperyalîzmê di pirsgirêka Kurd / Kurdistanê de ne hewqas in. Di peymana 1975 ya Cezayîrê ku jo bo Gelê Kurd bedêlek giran bû û di koçberkirina 1991 ya rejima Sedam de, siyaseta ku YDA şopand, bi qanda dewletên Îraq û İranê berpirsiyar e.
Tevgera Kominîst ya Kurdistan di wê baweriyê de ye ku hesab û pî-lanên emperyalîzmê yên ji bo herêmê ancax, bi vîna siyasî ya yekgirtî ya gelan dê karibe were xerakirin; nexşeya siyasî-erdnîgarî ya ku dervayî vîna
Gelê Kurd û bi giştî ya gelên Rojhilatanavîn, nasnake.
Yekîtiya Kurdistan û Gelê Kurd wekî mafekî dîrokî dibîne. Di navbera parçeyên Kurdistanê de, geş kirina alîkarîya siyasî ya tevgera kominîst ya tevgera demokratîk ya netewî diparêze.
Lİ SEDSALA 21. QADA ŞERÊ SERDESTÎ YÊ
NAVBERA EMPERYALİSTAN PARZEMÎNA ASYA
Di navbera navendên hêzên emperyalîst de, şerê parvekirina bazarê, ji nû ve gur dibe. Qada vî şerî yê bingehîn jî bigiştî parzemîna Asya, bi taybetî
Rojhilatanavîn e. Bloqa YDA-İnglîstan di sedsala 20. de, bi dustûra

“yê li Asyayê serdest be, li dinyayê jî serdest e.” tevdigere. Asya, ji alî çavkaniya
enerjiyê ya fosîl û ji alî nifûsê ve piraniyek mezin ya dinyayê temsîl dike. Pergala emperyalîst-kapîtalîst bi girêdanek jîyanî ve bi çavkaniyên enerjî yên fosîl (petrol, xaza xwezayî hwd) ve girêdayî ye ku ew jî bigiştî li Asya, bi taybetî li Rojhilatanavîn peyda dibin; sedema ku emperyalîzma YDA ku berê Afxanistan dû re jî İraq dagir kir, ev e. Armanc ew e ku çavkaniyên
enerjiyê û erdnîgara u xetên enerjiyê lê ne û tê re derbas dibin, ji nû ve bixe bin kontrolê. Armanc, Asya ku carek din hebûn û hêza xwe bi Rojava bide pejirandin, ji nû ve “bixe qalib” û kontrol bike. Armanc dorpêç kirina Rûsyayê, armanc hilberîn û xeridîna kapîtalîst, bi şerên herêmî, hevseng kirin e. Çimkî şer, ji bo emperyalzmê, di heman demê de
xebitîna “projeyên mezin yên giştî” jî pêk tîne. Pergala emperyalîst-kapîta-

lîst bêyî şer nikare bijî. Kapîtalîzm bi şer welidî û pê mezin bû. Di tevn û derûna wê de şer heye. Ya paşîn armanc, bi tektîka “lêdana pêşgirî” hem şer li dûrî welatê xwe li dar bixe û hem jî rewşa şer, teror û kaosê li dinyayê
jîndar bike û pê, şerê çînan yên ku ji binî tê, şerê bêmilkan yê raberî bimilkan di bin siyê de bihêle. Propaxandaya birina “demokrasî, azadî” bo Asyayayê, Rojhilata navîn jî tenê çarên siyaseta dagiriyê ye.
Bloka YDA-Îngilîstanê ku bi israr dixwazin NATO yê li Rojhilat bi cîh bikin û hewlên wan yên li Deryareş, Qefqasyaya Başûr û li Asyanavîn yên leşkerî, siyasî, aborî, gavên pêşî yên Stratejiya Avrasyayê ne. YDA van gavan

dike sipartek û bi firsendîtina rewşa siyasî ya germ ku 11 İlon 2001 ê bi destxistibû, berê Afganistan, dû re İraq dagir kr. Li van welatên ku dagir kiriye, per û baskên wê neşkên, dê dora dagir kirinê were hin welatên din.

Dost û dijminê emperyalîzmê nîn in, berjewendiyên wê henê û li gora berjewendiyê dost û dijmin guherbariyê nîşan dide. Emperyalîzma YDA ne ji bo “azadiya” gelê Kurd û Ereb, ji bo berjewendiyên xwe İraq dagir kir. Venebûnên stratejiya îxrac kirina “îstîqrar”, “azadî” ya bi geş kirina şer,

dagir kirin û hêza tankan ku YDA li dinyayê û li İraq û Rojhilatanavîn pêk tîne, kûr dibe. Daneyên ku dê bikeve rewşa Almanya ya sedsala 20. bi hêz dibe.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan, hişyarkirina kesên ku dibêjin emperyalîzma

YDA “dostê” gelê Kurd e, ji xwe re wezîfe dibîne û binî xêz dike ku

bi benê YDA nayê ketin bîrê, gazî tevgera netewî ya Kurd dike ku helwestek

dînamîk li dijî emperyalîzmê nîşan bide.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan, tenê bi çav û berjewendiyên gelê Kurd li Rojhilatanavîn nanêre. Berjewendiyên gelên Ereb, Fars, Azerî, Tirk, Ermen,

Çerkez hwd. bi yên gelê Kurd re wekî bitûnî dibîne û diparêze.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan; bawer dike ku dînamîka demokratîk ya netewî ya Kurd, di Rojhilatanavîn potansiyelek guherînê ya mezin dihewîne. Binî xêz dike ku pêşîlêgirtina vê potansiyelê ku bibe hêza yedek ya siyaseta

emperyalîzmê, berpirsiyarî û wezîfeya siyaseta pêşverû, şoreşger,

kominîst yên herêmê û Kurdistanê ye. Herkesî gazî wezîfê dike ku potansiyela
veguherînê ya Kurd bikin tekoşîna netewî azadî-sosyalîzm ya gelê
Kurd û dînamîka şerê demokrasî-sosoyalîzm ya gelên herêmê.
119
‘SİYASETA BERJEWENDÎ YA NETEWÎ’
TİM DİJMİN HİLDİBERÎNE
Her netewe, heta her erdnîgara ku bi dewlet sînor lê hatiye xêz kirin, “dîroka netewî” ya xwe nivîsî û derxist pêş. Her “dîroka netewî” kêm zêde îleh nirxên çandî, siyasî, zanistî (dîrok) yên gel û neteweyên cîran, ji xwe re kirin mal û nivîsandin; hêna jî tê nivîsandin. Her “dîroka netewî” bi xwenivîsîn namîne û weke ya ku dibêje “bixwe” nede, nirxên hinên din ji xwere dike mal. Di vê xwedîderketinê de, di serî de li Rojhilatanavîn û hewza Deryaspî, di dîrokê de hevderbasa çandê, xwedî rolekê ye,
ligel vê siyaseta ku “berjewendiyên netewî” ji xwe re kiriye al ya neteweperwer
rolek diyarker lîstiye. Wekî guncantirîn dîrokzanên Awrûpa yên burjuvazî dîroka dinyayê bi perspektîfa navend Awrûpa nivîsandinê ve pêkanîne.
Bi siyaseta ku “berjewendiya netewî” tevere digre, ne li dinyayê ne jî li Rojhilatanavîn di leha gelan de pirsgirêk nayên çareserkirin. Ji ber ku “berjewendiya netewî” ya her dewletê, her neteweyê, di serî de yên cîran,
yên dewletên an jî yên netewe / neteweyên din kêm zêde teqez têkveduxwe.
Sedema bingeh ya hevgewuxandina xwînî ya di 200 salên paşîn
de tê domandin ya di navbera dewlet an jî netewan de, herkes dixwaze

“berjwendiya netewî” ya xwe li dijî cîranên xwe û yên din geş bike. Ev siyaseta
bi tevera ?berjewendiya netewî” ne dost, dijmin hildiberîne û bi propaxandayê armanc dike ku di heşê girseyan de “dijmin” tim jîndar bihêle. Wekî şovenîzmê navendîtiya etnîk, şertê bingehîn yê nêrîna li “yê di” an jî “yê din kirin” ê yê. Berjewendiya netewî îcaba xwezaya xwe, ne dost lê hilberandina dijminî ye, ji vir tê.
Rejimên mîna İran, Tirkiye, bi boneya “berjewendiya netewî” Netewê Kurd û netewên din û kêmarên di bin dest de dihêle; tevkuştina Ermenan bi îcaba “berjewendiya netewî” pêk hat; Îngilîstan û Fransa ji bo “berjewendiyên
netewî” Asya û Afrîka kirin metingeh. YDA ji bo “berjewendiyên netewî” İraq dagir kir, İran û İraq dîsa ji bo “berjewendiyên netewî” 8 salan şer kirin.
Di sedsala vê paşiyê de, wekî îcaba “siyaseta netewî” gel bi hev hatin gewuxandin. Encam: Neçareserî, di her carê de bêçareserî kûr bû. Siyaseta
ku herkesî li ser bingeha “berjewendiya netewî” geş kir ji gelan, civa-
120
kan re ne aştî, demokrasî û azadî, lê xizanî, zextên siyasî yên giran yên di bin rejimên dîktayên paşverû û şerên dawî lênayê hilberand û hildiberîne.
Li Rojhilatanavîn siyaseta “berjewendiya netewî” çawa ku çareserî nayne; projeyên siyasî yên bi referansa olî û bi esasî pergala şerîetê jî, ji felsefe û ji hêza afirandina biratiya gelan û pirsgirêkên gel û civakan bêpar e. İslama ku bi şerê navxwe yê xwînî yên di nav mezheb û terîqetan û yê di nav şîa-sune ku hêna jî berdewam e ku reha wê di nav xwe de jî dûr dere, dabeşbûye û helbet ji İslama siyasî, persgirêkên erdnîgara me

nikare çareser bike. Bi taybetî Îslama siyasî ku berhema projeya “Kembera
Kesk” ya emperyalîzmê ye û pergalên bi referansa olî, ji navikê bi emperyalîzma
Rojava ve girêdayî ne û ji ber vê, di dîroka nêz de ne çareserî,
tim bêçareserî hilberandine.
Ji emperyalîzma Rojava hêvîkirin, modernîzma Rojava û siyaseta wê
ya aborî ya pêşvebirvan wekî rizgarker dîtin, venebûneke din e. Siyaseta
hevkarîya bi emperyalîzmê re dê nikaribe rizgarîya gelan bîne, ji dema
mêtingehkarîya klasîk û heta roja me, di drokê de hatiye îspat kirin.
Tevgera Kominîst ya Kurdistan, di bin roniya vê perspektîfê giştî de; neteweperwerîya
şoven, îlheqker, mêtinger, emperyalîst ango neteweperwerîya
ku xwedî fikra emperyal in ji neteweperwerîya netewê bindest, yên
têkoşîna hebûnê didin, wekî regez ji hev ciyawaz dike, naveroka demokratîk
ya neteweperwerîya netewê bindest yên li dijî emperyalîzmê, mêtingehiyê
pergalên îlheqker têdikoşin jî girîng bibîne.
Tevgera Kominîst ya Kurdistan; ne neteweperweriyê lê gerdûnîtiyê, li
şûna berjewendiya giştî ya netewe, berjewendî û dahatûya gel, gelan bi
kirpa E. Xanî, nêzîkahiya “hemû gelên li ser rûyê dinyayê, bi comerdî vexwend
ser wê sifrê” bingeh digre, di zemînek hevdem de geş dike. Ji erdnî-
gara ku ling lê ye (ji Kurdistanê) bi bitûnî li herêmê-dinyayê dinêre; bratiya
gelan û di kîşwera çand serdest ya dahatûyê de têkilandina gelan ya
azad armanc dike.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan; perspektîfa “bi pîva mêjtina ku kes ji alî kesekî din ve, bi dawî bibe, paşî li mêjtina neteweyê ku ji alî neteweyekî din ve dê lê were. Bi pîva ku dijberîya nav çînên netewe ji holê rabe, dê dijminantiya neteweyekî ya raberî yê din jî de bi paşî bibe” (Manîfestoya Kominîst) diparêze. Wekî stratejî şerê vê dide.

121

KURDİSTAN

SİYASETA ENTEGRASYONÊ

YA PERGALA TİRKİYÊ Û ENCAMÊN WÊ

Pergala Tirkiyê ku du taybetmendiyên damezrandinê yên wekî unîterî û neteweperwerî bingeh girtiye, di serî de bi şertê ku girêdayî “yekîtiya nedabeş ya Tirkiyê” bin, ji bo çînên ji netewe û kêmarên misilman tên, ji mêtingeha klasîk ciyawaztir, sînorkirin û astengî li ber mafê wan yê milk bi destxistinê neaniye. Ya duwemîn; di serî de armanca ji Kurdan û ji kêmaran afirandina neteweyekî (Tirk kirin) ye. Ya sêyemîn; bi taybetî ji layenê

Kurdan ve; Kurd jî mîna Tirkan xwedî heman baweriyên olî bûne.

Wekî encam, ji bo ku li Kurdistanê serdestiya xwe bajo, burjuvaziyê Tirkiyê

û rejima wê ku tenê bi zor û zordestiyê qîma xwe neaniye, di bin diyarkerîya

xwe de, bi burjuvazî û çînên serdest yên Kurdistanê re li hev

hat.

Pergala Tirkiyê, wekî girêdayî armanca Tirkirinê; di siyaseta bihêz kirin ya geşkirina entegrasyonê de, bi pîlan birayê wê yê cêwî asîmîlasyon jî geş kiriye.

122

Ligel Kurdistan, li bajarên Tirkiyê (bi taybetî li bajrên lîmanan) jî, ku çî-

na burjuvaziyê Kurd / Kurdistanê derfeta razemenî-geşbûn û mezinbûnê dît, ji welîdîna xwe pê ve girêdayî burjuvaziyê Tirkiyê û wekî yekgirtiyê wê geş bûye. Ewqas ku di bin diyarkerîya burjuvaziyê Tirk / Tirkiyê de her burjuvaziyên ku ji netewe û kemarên ciyawaz hatî, xerca yekîtiya ku pêk hatiye ne “welat, netewe, al” e, berjewendiya çînî ye. Yekîtiya vê berjewendiyê
îro jî didome. Burjuvaziyê Kurdistan, ji bo îcaba berjewendiyên
xwe yên çînî, bi qanda aborî, ji alî siyasî ve jî bûye perçeyek pergala Tirkiyê.
Çimkî, burjuvaziyê Kurd ku di sînorên pergala unîterî de, di îqtîdarê
de gihîşt derfeta xwedî gotinê, dewleta KT û avahiya wê ya milîtarîst mîna hêza parastina xwe dibîne.
Li dijî pirsgirêka netewî ya Netewê Kurd çareser nebûye û hebûna Kurdan jî tê înkar kirin, burjuvaziyê Kurd wekî çîn, fonksiyona xwe ya netewî winda kiriye, derî îstîsnayan, ji tekoşîna azadiya netewî qetiyaye. Bi qanda
ji alî çînî, ji alî netewî ve jî aliyê xwe diyar kiriye, li dijî têkoşîna hember pergalê û kapîtalîzmê geş dibe û dê geş bibe de, li gel birayê xwe yê çînî, burjuvaziyê Tirkiyê re tevdigere. Êdî li Kurdistanê dewleta KT yê ligel ku li Kurdistanê navgîna zordestiya netewî ya li ser gel e, navgîna burjuvazî
û çînên serdest yên Kurd yên çewsandin û mêjtina girseyên karker-kedkar
e jî.
Ligel çînên serdest yên Kurd, girseyên karker û kedkar jî, çi ji ber dîtina deriyekî nan, çi ji ber stratejiya şer, ji alî pergalê ve bi zora çekan koç-berî bajarên Tirkiyê hatine kirin. Bi encama vê koçberiyê li Stenbol, İzmîr, Çukurova, Antalya di serî de li bajarên Tirkiyê kêmarek Kurd yê cidî hatiye

pê. Ewqas ku rêjeyek bi qanda nîvê gelheya Kurdistanê, li bajarên Tirkiyê bi cîh bûne. Ev rewş;

Ligel ku mîna neyiniyên ruxîn û parçebûna avahiya demografîk, çandî, netewî a gelê Kurd dihewîne, eriniyek mîna ji alî şertên daringî ve pirek û perçînek navxwe ya şoreşek yekgirtî ya nav Tirkiyê û Kurdistan dihewîne.

Karker, kedkarên Kurd, Tirk û yên ji gelên din ku sendîka di serî de, di avahiyên karbendî, aborî yên hevpar de cîh digrin, ji berîdayinek bi zanebûn bêtir, encama van şertên daringî yên diyarkirî ne.

Lİ KURDİSTANA BAKUR KAPÎTALÎZM JİYANÊ DİYAR DİKE

Li Kurdistana Bakur êdî ji mêj ve ye, yê jiyana aborî, civakî û çandî di-123 yardike, terzê hilberînê yê kapîtalîst e. Bi taybetî, di 15 salên vê dawiyê de kapîtalîzm hem wekî emûdî û hem jî ufkî geşedanek cidî nîşan dide. Du hêmanên bingehîn yên ku vê geşadanê ditetikînin hene.

Yekemîn: “tevgera guhertina senayî” yê ku tê bi nav kirin û wekî par-çeyek veguhestina senanyiyê ji navendê bo herêmê, Tirkiye jî senayiyê ji merkezên xwe diguhêze bajarên dorhêlê. Ya yekemîn ev geşedan e. Di encama vê geşedanê de li Konya, Aydin, Denîzlî, Trakya û li Kurdistanê jî Dîlok, Semsûr, Meraş û Meletî, erdnîgara ku van deran diguncîne, geşedanek senayiyê hat jîyîn, tê jîyîn. Her çar bajarên Kurdistanê yên nav borî bere bere pev ditêkilin û vediguherin hewzeyek senayiyê.

Duyemîn: Rejima unîter ya şoven ya Tirkiyê bi armanca geşkirina entegrasyon û asîmîlasyonê kapîtalîzma ku geş kiribû ya ji Dîlokê ta Erzuromê li bajarên ser sînor bi heman armancê, di van salên paşîn de li hundirê

Kurdistanê jî pêk tîne. Projeya GAP ê senayîbûna sipartî zîreetê li sêkunca Riha, Amed û Mêrdînê jî geş dike.
Ligel senayiyê di sektora zîreet û xizmetê de jî êdî ya diyarker e, têkiliyên hilberîn-xeridîn yên xwerû yên kaptalîzmê ne. Bi armanca ku li Kurdistê jî civakek ku dirav û milkiyeta taybet dihebînin bête afirandin, gel ketiye bin gulebarana reklamên bazirganî û propaxanda, ligel ku berjewendiya burjuvazû ya çînî ji alî gel ve bête têkvexwarin, rasterast an nerasterast ragihandêra siyaseta asîmîlasyonê ya pergalê ye.
Wekî encamek jêneger ya geşbûna kapîtalîzmê, li Kurdistanê çînên hemdem afirî û diafirin. Netewê Kurd neteweyeke bindest e, lê belê netewe di nav xwe de, xwedî berjewendiyên çînî yên dijber bi burjûva bi çîna karker û tebeqeyên navber dihewîne. Gundîtî perçe bûye, ji alîyekî ve burjuvaziyê zîreetê û xakê, li hêla din bi berfirehî karkerên zîreetê, gundiyên xizan an jî karkerên demsalî, gundîtiya biçûk û navîn heye. Di vê pêvajoyê de bajarên Kurdistanê jî, bişid, bi girseya bêkaran-xizanan tijî bû, fûrîya.
Encamek geşedana kapîtalîzmê ya din jî, bi rêjeyek mezin, bere bere keda jin û zarokan jî li bajar û li qadên zîreetê vedikêşin nav hilberînê. Keda jin û zarokan ya bêsendîka, bêsîgorte, ji her mafê civakî bêpar, ji bo burjuvaziyê Kurd / Kurdistan, mûçedarên ku ji wan nirxa zêde pir bidest dixe ye. Bi taybetî keda jinê ya bimûçe ligel zîreetê di sektora senayî, bazirganî û xizmetê de dibe tevlêbûn ya girseya dixebite û di van salên dawî
124

de, di nav gişte keda bimûçe de keda jin û zarokan mezintir dibe. Li hember
akama ol, kevneşopî û toreyan, jin ji bo kar û nan mecbûrî kuçe û derketina kuçeyan tê kirin. Ev geşedan, ji alîyekî ve barekî giran li jina dixebite
ya bimûçe dike, ji alîyekî din ve bi teşeyî an sînorkirî be jî, ji bo jinê di jiyana civakî de derfeta mîna kesayetîbûnê, azadbûnê pêşkêş dike. Di van salên dawî de bajar bişid mezin bûn, adetî bi mirovan tijî bû, fûrîya. Bajarîbûna ku mezinbûyî, ji aliyekî ve paralelî geşedanên civakî aborî ji çolteran berbi bajar ve bû sedema koçberiyê, ji aliyê din ve pergala
Tikiyê çoltera Kurdistanê vala dike û berê wan dide bajaran. Encam; di demek kurt de bajarên Kurdistan û Tirkiyê bi milyonan gelheyên çolterê
yên Kurd / Kurdistanî tijî bû, fûrîya. Ev pêvajo, ji mezinbûyîna bişid ya bajaran
bêtir, bişid ji gundîbûna wan re rê vekir. Bajarîbûna şewş an jî gundîbûna bajaran, tevgera kominîst û demokratîk netewî, bi pirsgirêkên nû û giran ve rûbirû hişt. Kolan û kuçên bajaran bi betalan, bi xizanan, bi firoş-kerên seyar û parsekan tijî bûn. Fuhûş û bazirganiya jinê, dejenerasyon bişid zêde bû. Ji aliyekî ve otomobîla luks, telefonên dest, kompîtur û heta
bi helîkopterên taybet, ji alî din ji yekê bêtir jin, doza xwînê û jinên ku bi çarşevên reş diçin kar, evana dîmenên bajarîbûn û modernbûna şewş in. Ligel van pirsgirêkên giran û şewş bajar, li Kurdistanê navendên gelhe, tekoşîn
û geşedanên siyasî, civakî, aborî û bi vê têkildar kêşeya şoreşa Kurdistanê ne. Tekoşîna ji bo azadiya netewî û sosyalîzmê dê bête geşkirin, di

heman demê de pirsgirêkên giran û girift jî têkvedixwun.
Li Kurdistanê, di serî de ya di navbera bujûvazî û girseya karker-kedkar, nakokî û pevçûnên heyî, ji nakokiya navbera ked semayê xwedî dibe û li dora wê geş dibe, teşedigre. Wekî guncantirîn nakokî û pevçûn di navbera burjuvazî û çîna kaker, çînên xwedî milkên mezin û bêmilkan, mêtinkar û yên tên mêtin de geş dibe. Di civaka Kurd de ku heta niha hev hesibandinek kûr nejiyaye hevhesabdayina navbera çînan ya dahatû, dê li
ser van nakokî û pevçûnan geş bibe.
Helbet karker, kedkar, bêkar û girseya xizan ya li bajêr çi bibîne bi (kî-jan hilberîna daringî) di têkiliyê de be, wê fam dike û dê fam bike. Ancax pirsgirêka ku çi bête dayîn heye! Pergal û burjûvazî û wekî pir layen, li zemînên nû, di girseyan de kesayetiyek nû (di eslê xwe de bêkesayetî) ezî-
tiyek nû û bi aîdîyetek nû wan bi pergalê ve girêdide. Pirsgirêk, welatparêz, pêşverû, kominîstên Kurdistanê, dê çi bidin girseyên kar-
125
ker-kedkar, zanebûnek çawa û rêxistinek çawa dê bête geş kirin. Pirsgirêk;
geşkirina tekoşîna siyasî ya girêdayî armanca guherîna bingehîn ya radîkal
ku dê kapîtalîzmê, pergala milkiyeta taybet bibore ye. Pirsgirêk, kaniya hemû nakokî û pirsgirêkên pergala milkiyeta taybet bi şoreşek civakî borandin
e.
Tevgera Kominîst ya Kurdistan, li Kurdistanê wekî stratejî, şoreşa civakî ku dê paşî li pergala mêtinkar ya kapîtalîst bîne, armanc dike, bi vê armanca

bingehîn ve girêdayî, ji bo reforman têdikoşe. Ji bo daxwazên bilez yên aborî, civakî yên karker, bêkar, bêmilk û gundiyên kedkar têkoşîn û propaxandaya siyasî dê geş bike.

PİRSGİRÊKA KURD PİRSGİRÊKEK WELAT Û NETEWE YE

Statuya siyasî ya Kudistana Bakurî çi mêtingeh çi îlheq dibe, di bingeha xwe de Netewê Kurd, neteweyekî bindest e. Gelê Kurd ji hemû mafên xwe yên netewî bêpar hatiye hiştin, red û înkara li ser hebûna netewê Kurd ya KT berdwam dibe. Serekebûna nakokiya navbera pergala KT û Neteweyê Kurd ji vê siyaseta red û înkarê der dibe. Dewleta KT, dagirkirina

li ser Kurdistanê, ji Osmaniyan dewr girt, kûrtir kir, di pêvajoyê de serdestiya

xwe ya leşkerî, îdarî û siyasî geş kir. Dewleta KT, serdestiya xwe, ji

serî de bi tevkuştinan, sirgûnan, bi koçber kirina darê zorê û bi asîmîlasyona

ku bi vanan re tevlîhev e, didomîne.

Dagirkirina dewleta KT; ji alî aborî ve Kurdistan ji bo burjuvaziyê Tirkiyê re bazarek hundir ya berfireh pêşkêş dike, çavkaniyên dewlemendiyê, ji bo berjewendiya xwe, heta ku bigihê talan û wêran kirinê dimêje, ji alî siyasî ve, di bin çewsandina hêzek biyanî de, gel ji hemû mafên xwe yen netewî bêpar hatiye hiştin; ji alî civakî ve, li avahiya jor bermayên feodal û eşîrtî bi zanebûn zindî hatiye hiştin; ji alî çandî ve nezanî û ji par re mayin zindî hatiye hiştin, li ser ziman û çanda Kurd, zordestî û bi te-şeyê kêmdîtina netewî ya giran, hebûna xwe didomîne. Pergala şoven ya KT, bi vanan hemûyan, rawestandina geşbûna gelê Kurd ya netewî-çandî, di pêvajoyê de bi temamî helandinê armanc dike. Azadiya netewî ku daxwaza

sereke ya gelê Kurd e, di serî de bi zimanê dayikê mafê perwerdê,

daxwazên netewî yên rojane ku daxwazên divê bilez bêne çareser kirin, ji
vê derê tên.
Tevgera Kominîst ya Kurdistan; pirsgirêka Kurd wekî pirsgirêka rizgarî-
126
ya welatekî, azadiya neteweyekî dibîne û çareserkirina wê, li erdnîgara Kurdistanê de bi çi teşeyî be, ji ve azade, di bingeha xwe de pirsgirêka mafê avakirina dewleta xwe ya netewî dibîne û binê vê xêz dike. Ji vê tespîtê
ku pirsgirêka Kurd / Kurdistanê, di nava avahiya unîterî û sparteka
“yek dewlet, yek netewe, yek ziman de” çareser nabe.
Tevgera Kominîst ya Kurdistan; ji rewşa xwe ya siyasî, civakî, aborî ya parçeyê Bakurê Kurdistanê bi rê dikeve û di rewşa ku li Tirkiyê ji bo borî-na avahiya dewleta unîter, milîtarîst, şoven mixalefetek dijber ya berfireh heye, di vê rewşê de şoreşa siyasî ya hevpar ya gelan armanc dike. Şoreşa siyasî ya ku dê pergalê biborîne, divê bi du Komarên sosyalîst yên federe bête bitac kirin. Mafê çarenûsê dê bi çi teşeyî wekî “serxwebûn”, an “federasyon”
ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê, bi temamî di rewşek azad de
divê li erêniya gelê kurd serî bête dan, di vê layenê de armanc dike ku wekî sereta li Kurdistanê serî li referandûmê bête dan. Ancax, Tevgera Kominîst
ya Kurdistanê, bi esasî ji geşkirina şoreşa netewî û civakî ya Kurdistana Bukur xwe berpirsiyar dibîne; ku rewşek giştî ya şoreşê li Tirkiyê tunebe, ji bo mixalefeta netewî û civakî ya Kurdistanê, îqtîdarbûnek bi Kurdistanê sînorkirî pêk were, di vê pêvajoyê de ji bo pêşengiya şoreşê dê têbikoşe. Di vê pêvajoya ku dê serbixwe geş bibe de, ji bo ku tevereyek kedê qezenc bike, dê hemû hêza xwe derxe holê.

Pirsgirêka Kurd, tenê bi bihûdê netewî, dibe ku, di têkiliyên mêtinger û hilberînê yên kapîtalîst de bêyî ku guherînên kûr pêk werin, çareser bibe. Gelek nimûneyên vê hene û nimûneya ku bi taybetiya me re yekser têkildar
e, Kurdistana Başûr e. Hêzên dervayî kominîstan, hêzên demokratîk
yên netewî ku tenê di lêgerînek çareserkirina demokratîk ya netewî de ne,
piranî di vê layenê de ne.
Tevgera Kominst ya Kurdistan, di nav sînorên pergalê û sazûmana kapîtalîst
de, çareserkirina pirsgirêka netewî ya demokratîk ya burjuva, wek
girêdayî hedefa xwe ya stratejîk, diparêze. Vê parastina xwe, bi tezek siyasî
ya “federasyona demokratîk û mafên kêmneteweyan” têkveduxwe, rojane
dike. Ji bo ku hemû avahiyên kominîst û yên demokratîk yên netewî,
rewşenbîr û gelê kedkar li pişt raweste û ji bo wê têbikoşe û ji bo ku bike
hedefek pratîk-polîtîk, têdikoşe. Ji bo ku li Kurdistanê vîna siyasî ya yekgirtî
bête afirandin û ev vîna ku teşeyek polîtîk û rêxistinî pêk bîne, ji kominîstan,
demokratên welatperwer, lîberal, partiyên welatparêz yên İslamî,
127
hêz û heta kesan, di binê sîwanek siyasî (platform, eniya netewî, Kongreya
Netewî hwd.) de biyek bike, ji bo avahiyek weha ya mayinde bête afirandin
tekoşînê geş dike.

PİRSGİRÊKA KÊMARAN

Kêmarên Ereb, Ermen, Çerkez, Eşûrî hwd. yên li Kurdistanê, mîna gelê Kurd, ji alî pergala Tikiyê ve ketin bin çewsandinê. Ev gel ji hemû mafên xwe yên çandî, netewî bêpar hatine hiştin û bi asîmîlasyona darê zorê têne helandin. Li Kurdistana Bakurî, bi taybetî li bajarên ser sînor, kêmarek
Tirk ya cidî jî heye. Li Kurdistanê, ti pirsgirêkek netewî ya kêmara Tirk nîne, lê ji alî çînî ve ligel Gelê Kurd, di binê heman çewsandin û mêtingeriyê
de ye.

Li Enetolya navend ji mêj ve an ji ber xwe an ji koçberiyek girseyî ya
bi darê zorê pêk hatiye û di encama wê de li hin navçe û herêman ku piraniya
gelheyê pêk tînin, kêmarek Kurd afiriye. Kêmara li Enetoliya navî in
e, ji mafê xwe yên netewî bêpar e û di bin asîmîlasyonek giran de ye.
Di serî de li metropolên Tirkiyê, hema hema li hemû bajarên xuya,
kêm an pir gelheyek Kurd ya diyar heye. Li bajarên metropol yên mîna Stenbol, İzmîr, Çukurova, Antalya bi milyonan Kurd / Kurdistaniyan dihewînin.

Kêmara Kurd ya li van deran ji alî çînî ve bi kedkarên Tirk û yên ji
gelên din tên ve heman qederê parvedikin, lê belê ji alî netewî ve, di serî de ziman û çanda wan ya netewî, wekî netewî, bi tunebûnê re rûbirû ne.
Tevgera Kominîst ya Kurdistan, diyar dike ku çarenûsa kêmarên Ereb, Ermen, Çerkez, Eşûrî û Tirk bi yê gelê Kurd re ketiye nav hev. Girseyên karker û kedkarên ji kemaran tên, ji bo pêkanîna şoreşa Kurdistanê, ligel karker, kedkarên Kurd, wan gazî yek rêxistinê û tekoşînê dike. Îlan dike ku
dê li Kurdistanek azad, kêmar ji alî çandî û netewî ve, dê karibin xwe bi

azadî îfade û bi rêxistin bikin, mafên wan dê di bin ewlehiyê de bin.
Mafên netewî-çandî ya kemara Kurd ya li Enetoliya navîn û metropolên Tirkiyê, diparêze û diyar dike ku dê rizgarîya wan ya paşî bi tekoşî-
na gelên karker-kedkar yên Tirkiyê ya ji bo demokrasî û sosyalîzmê de pêk
were.
Ji bo geş kirina mafê netewî, çandî, civakî ya girseya Kurd ya li Ewrûpa têdikoşe.
Tevgera Kominîst ya Kurdistan; wekî nêzîktêdyinek bingehîn ya din
128
têkildarî kêmarên li Kurdistan û Tirkiye; li erdnîgarek diyar (bajar, navçe, gund. hwd.) ku kêmar lê piraniya gelheyê pêk tînin, ji wê kêmarê re xweserîya
erdnîgarîyê bingeh digre û li ser vê bingehê çareseriyê geş dike.
OL Û KÊMARÊN OLÎ
Ol jî mîna hemû teşeyên heş, vebiriqîna cîhana daringî ya ku di heşê mirov de ye. Di civakên bi çîn de ol, takekes gava di bin şertên jiyanê yên giran de bêçare dimîne û tenê dibe, wekî lîmanek ewle dibîne û têdigihê, an jî xwe lêgirtina asîmanan (Xweda) ku pê dane gihîştin e. Akama ol, ku li ser meyl û heşê girseyên ku ber bi bêçaretiyê û çewisandinê ve hatine daf dan û yên bi esasî bindest in, ji vir tê. İslam jî, ji rewşê ji xwe re wezî-fe derxistiye û xwe wekî pira navbera her du dinyayan, ji kes / civakê re pêşkêş dike, ji ber vê ye.
Di heqîqetê de, “dinya din” hilberîna vebiriqîna vê dinyayê ango ya dinya daringî ye; paralelî şertên aborî, civakî. çandî yê dinya daringî (rasteqênî)
ye, ol jî eşkere an sergirtî tûşî veguherînê dibin. Li pey hev îlana sê olên yek xwedayî û bi sedsalan e ku her sê ol jî bi îçtîhadan tekamula

xwe didomînin, ev yek, li gora mercan xwe veguhertin e. Ola paşî ya semawî
İslam jî xwe li gora vê guherînê veguhertiye. İslama ku gava nû derket bazirganî dipejirand, di roja me de jî piyaseya serbest û heta siyaseta abori ya neolîberal erê dike, li gora şertên guherî, milkiyeta takekesî erê dike, pîroz dike û diparêze. Ol, di rewşa me de İslam, di xuyabûnê de bi xebitîna sazkirina navbera dinya daringî manewî dertê pêşberî civakê, lê belê di eslê xwe de qada hemû xebatê ya ol an jî misyona wê ya sazker, bi temamî têkildarî sazkirina jîyana mirovê li dinya daringî ya aborî, civakî, siyasî û çandî ye. Ol têkildarî dinya "manewî" gotinan dibêje, lê belê têkildarî jiyana "daringî" kar dike. Wekî makezagona İslamê şerîet tam jî vanan dixebitîne.
Kominîst, kes an jî gelê ku bawerîya olî, têkiliya di navbera xwe û
Xwedê de bisînor dike û bawerîya xwe ya olî wekî navgînek serdestî an jî mêtingerî li ser hinekî din bikarnayênin, ji ber bawerîya wî ya olî, hedef nagirin; dijberê vê, dixwaze wan qezenc bike û hemberî pergalê sazûmana
mêtingeriyê wan bikşîne nava tekoşîna birêxistin. Ji bo jarbûna bandora ola siyasî ya li ser gel û ya girîng ji bo asteng kirina akama li ser tercîha gel, divê dorpêç kirin û tenê hiştina girseya karker kedkar ku ber bi bêka-
129
rîtiyê ve tê daf dan, bête borîn. Lê belê divê ji rewşa ku tenê daxwazker, pêşniyarker, bendekar û bêlebat bête derxistin û bibe dînamîk, kirdeyek siyasî ku karibe bibe afrînerê dîrok, hedef û daxwazên xwe. Li vira armanca
me ew e ku em girseyên berfireh yên xwedî bawerîyên olî, hedef û daxwazên wan yên li dijî pergala şoven û sazûmana mêtinger wan bikin kirdeyek dînamîk.

Tevgera Kominîst ya Kurdistan, di pirsgirêka azadiya ol û wîjdan de ji vê nêzîkahiyê tevdigere û wekî regezekê nêzîkahiya sekularîzmê bingeh digre. Bi tevgerîna vê nêzîkahiya bingehîn, diparêze ku dewlet xwe ji hemû
ol, mezheb û bawerîyan cuda bike, dûrahiya wekhev li hember gişan raweste. Tevgerên kevneperst yên İslamî yên ku şerîetê, bi nêzîkahiya neteperwerîya
Tirk û Tirktiyê jî bi nêzîkahiya şerîetê hevseng dikin û bi vî
awayî jî di bin navê “biratiya umetê” de eşkere an girtî Tirkbûniyê diparêzin,
wan wekî wersiyonek siyaseta şoven ya burjuva dibîne û li dijî
wan radiweste. Lê belê avahî û tevgerên İslamî yên demokratîk, li dijî emperyalîzmê
biratiya gelan, li dijî avahiya unîter ya KT, ji bo azadiya gelê
Kurd û kêmneteweyan, li dijî sazûmana mêtinger ya kapîtalîst, ji bo pergalek
“adil”, wekhev gazî tekoşînê dike.
Îqtîdara İtîhad Terakî di salên paşî yên Osmanî de, bi armanc / bi pîlan siyaseta bisilman kirin û Tirkirinê meşand ev siyaset heta roja me ji alî dewleta KT ve jî bisîstem hatiye meşandin. Misilman kirina gelên nemisilman,
Sunekirina Elewiyan, bi kûr kirin, di roja me de jî tê domandin
Tevgera Kominîst ya Kurdistan, ji bo rakirina zordestiya li ser gelên Elewî, Êzdî, Keldanî, Eşûrî bête rakirin û ji bo ku karibin xwe bi azadî îfade
bikin merc bêtin afirandin, têdikoşe. Gazî hindikahiyên olî dike ku li dijî siyaseta Tirkirinê-misilmankirinê-sunekirinê berxwedanek demokratîk geş
bikin. Ji bo li Kurdistanê biratiya rasteqîn ya navbera gel û civakên xwedî

baweriyên ciyawaz yên olî û ji bo bi azadî pev re jiyinê ku ev jî ji geşbûn û bihêzbûna çanda enternasyonalîst sadir dibe, ji bo vê yekê gaziya, ku bi karker û kedkarên Kurd re, pev re têbikoşin û bi rêxistin bibin, li wan dike.

WEKÎ ZAYENDA BİNDEST RİZGARİYA JİNÊ

Di dîrokê de, pirsgirêka jinê an jî têkçûna pêşîn ya dîrokî ya zayenda mê ya mezin, bi derbasbûna civaka biçîn ku tê de mirov mirovî dimête û 130
xistiye bin destên xwe re, dest pê kiriye. Ligel derbasbûna ji civaka bêçîn bo ya biçîn de, yên ku tûşî çewsandina dualî heta li ciyê ku çewsandina netewî lê heye tûşî çewsandina sêalî dibe, di serî de jin e. Lê belê kolebûn, serf bûn û paşîn wekî koleyê azad karker bûn, ne tenê xwerûyî jinê ye, bi jin û mêran ve xwerûyî çîna bindest e. Ji civaka maderşahî (bêçîn) derbasbûn î civaka biçîn, heta roja me, civak guherîne, li belê di van civakên
biçîn de, wekî zayenda bindest pirsgirêka jinê hem rewşa xwe ya xwerû parastiye û hem jî wekî jina kole, serf, karker di nava her civaka biçîn ku têkiliyên zordestî, newekhevî û mêtinger hilberandiye de, hebûna xwe ya rojane weke din jî domandiye. Ango ligel mêran heman heta girantir
zordestiya mêtingerîya çînî jiyaye, di heman pêvajoyê de, di civaka mêrserdest de jin, wekî zayenda bindest, tûşî çewsandinek xwerû jî bûye. Kapîtalîzmê, jin kêşaye nav pêvajoya hilberînê û ew kiriye regezek pergala piyaseya serbest. Paralelî diviyahiya hêza kar ya kapîtalîzmê jin, ji
mêj ve ye vekêşaye nav jiyana xebatê, raberî vê, di serî de mafên siyasî, bigiştî dema mafê jinê hatiye stendin paşiya sedsala 19. û sedsala 20. ne. Bi taybetî, di serî de mafê hilbijartin-hilbijirînê di sedsala 20. de, mafên siyasî,

civakî û dadî bidest xistiye, ango dema esasî ku jinê, ligel vatiniyên xwe qebûlkirina mafên wê ketiye bin ewlehiya zagonê, sedsala 20. ne. Pêşengek ji tevgera feminîst ya Fransizî Marîe Gouges (1755–1793) ji mêj ve bû digot ?ku mafê jinê ji bo daleqandinê heye, mafê wê ku derkeve kursiya meclîsê jî (heta bikeve lijneya dadweran jî) divê hebe" jî, lê jinê ancax di sedsala 20. de ev maf bi dest xist.

Em ji kîjan gûçê ve lê dinêrin binêrin, binketina jinê ya dîrokî, ango ku hat xistin rewşa zayendî, bi derbasbûna civaka biçînê re dest pêkiriye. Di xeleka civaka paşîn di pergala kapîtalîzmê de, di dîroka ku li paş hatiye hiştin, raberî vê pevçûnên ku bi bedelên giran pêkhatiye jî ev binkeftin

hêna jî nehatiye borîn.

Mezopotamya ku cara ewil şaristanî lê şîn bûye, di heman demê de, di dîrokê de cara pêşîn jin, lê ketiye rewşa zayenda bindest an jî pevçûnên ewil, li vê erdnîgarê hatiye avêtin. Erdnîgarek ku ajalvaniya ewil, zîreeta ewil ango jiyana xwecîh ya ewil û ji civaka bêçîn ya ewil, derbasbûna civaka

ewil ya biçîn, ya dîtir her sê olên mezin yên semawî ku jê xwedî-

bûn, wekî ola yekxwuda Zeduştî jî, ewil li vir hat holê.

Ola Zerduştî taybetiyên ji civaka bêçîn derbasî civaka biçîn, ji bêdew-

131

letiyê derbasî dewletbûnê, ji olên pirxwedayî derbasî yekxwedayîbûnê hildigre. Ola Zerdeşt regezên civaka bêçîn, civakên azad yên bêdewlet û pirxwedatiyê dihewîne, hema, ruyê wê vegerîyaye civaka biçîn, dewletê û

yekxwedayiyê û bi esasî van regezan têkveduxwe.

Di ol de kêmpayekirina jinê ku bi zerdeşt dest pêkir û li gora mêr ket rewşa talî, bi cihûtiyê û olên li pey yên semawî (İsewî, İslamî) dom kir.

Taybetiya hevpar ya olên semawî, civaka biçîn ya mêrserdest diparêze;bêtirîn
mêr dike xwediyê malbat û milkiyetê, xebitîna jinê jî bi xebata
malê û welidandinê bi sînor dike. Terikandina jina bêzarok, ku emrê
kitêba Mûsa ye, ji wê yekê tê. Ya paşî ne, Mûsa ku pêşengiya gelê Yahûdî
ku ji Mirsê, ji ber zilma fîrewnan reviyan kir û hewla wî ya ji bo hin reforman,
ne jî İsa ku li hin femînîzan û cîh bi cîh li hin regezên ji civaka komînal
ji par re mayî meylên wî yên anarşîzan-kominîzan û ne jî kirpandina
Mihemed ku “Bihuşt di bin lingên dayikan de ye” re, ne ola ku jin ji
rewşa talî, duwemîn derkeve û çêbûnên mayinde pêk werin.
Qada ku piragirêka jinê ya tîpîk lê tê jîyîn jî bigiştî mezopotama û bi
taybetî jî Kurdistan e. Li vê erdnîgarê hem mîtoya Hewa, tabûya zayendî û
heta mîtoya ku jin bêhêz e, gelek adet, tore û pêşdarazên ku hilberînên
dîroka rabirdû ne, ligel zordestî û mêtingerî ya xwerûyî kapîtalîzmê rû bi
rû ye.
Yê ku dibêje “Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e” gelê Kurd e. Hema bi gotina
“Çarika jina min li serê min be” yê ku jinê kêmpaye dike, adetî wekheviyê
sifir dike jî heman gelê Kurd e. Jina Kurd / Kurdistanê, gotina pêşiyan
ya “Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e” di tekoşîna azadî ya netewî ya sedsala dawî
de rast derxistiye. Di serhildanên netewî de, di girtinên girseyî de, li
ber deriyên girtîgehan, di şerê gerîla, bi tekoşîn û girevên aktîf yên li hemberî
karsazan, ev yek îspat kiriye, îspat dike. Jina Kurd ne tenê şahidê serhildan
û tekoşînê ye, lê dînamîka wê ya lebat e.
Tevgera Kominîst ya Kurdistan; nêzîkahiya “dê mirovahî bi pêşengiya

bîrdoza jinê rizgar bibe” çewt dibîne; materyalîzma dîrokî û Marksîzmê ne jin an jî mêr serdest; felsefeya rizgariyê û bîrdoza ji herdu zayendan yên bindest, yên tên mêtin, gelên di bin dest tên hêlan, çînan dibîne.
Li gora mêr, bi qanda naletkirina li jinê, pîrozandina wê jî çewt e.
Perspektîfa guherîn ya şoreşger ya sedsala 21. de, jin û mêr ne wekî zayend,
wekî mirov tê ragihîştin.
132
Bawer dike ku serkeftina sosyalîzmê nebe, rizgarîya jinê, jin nebe jî serkeftina sosyalîzmê ne gengaz e. Lê belê weke ku sosyalîzma hat jîyîn jî nîşan da ku, di bin îqtîdara sosyalîst de jî, pirsgirêka jinê, otomatîkman çareser nabe. Ji ber vê yekê jî, di sosyalîzmê de ku merheleya derbasbûna civaka kominîst ya jêr jî, pirsgirêka jinê herçend kêm bibe jî, dê hebûna xwe bidomîne.
Tevgera Kominîst ya Kurdistan; ji bo wekheviya navbera zayendan; bi jin û mêr, bi ciwan û kal ku bibe kirdeya siyasî ya lebat ya rizgarîya çînî-netewî ya gelê Kurd, jinê gazî şer dike. Di vê baweriyê de ye ku, di qadên civakî, siyasî, aborî de ji bo bi azadî û xwerû geşedan bête bidestxistin, divê bi dînamîkên hundirî re, jin tevgera xwe biafirîne.
ÇÎNA KARKER, SENDÎQE
Û RÊXİSTİNÊN KEDÊ YÊN NÛ
Pirsgirêkên ku sendîqe rûbirû ne, di serî de bi avahiya xwe ya bîrokratîk ya qedemeya kargerîyê ye; lê belê pirsgirêk bi vê, ne sînorkirî ye.
Di demên navbera paşiya sedsala 19. û nîvê ewil yê sedsala 20. de, bi giştî sendîqe, ne mezringehên xwedî milk û pereyan bûn. Ewqas ku li mekanên
mîna holikekê berxwedanên mezin û tevgerên grêvê karibûn birêxistin bikin. Di roja me de sendîqeya herî biçûk, herî zeîf jî, bi qanda

ku cidî bête gotin, xwedî menqûl û dermenqûl in. dî gotina kargerê sendîqeyê,
di heman demê de, kare bête gotin ku kargerê milkiyetek cidî ye
jî. Xwedî milkiyetbûn, sedemên dejenerebûn û bîrokratîkbûn yên sereke ne.
Zemîna girseyî ya sendîqayan teng bû; lê belê milkiyeta ku kargerîya sendîqeyê kontrol dike û îdare dike, tersê wê mezin bûye, ku ev jî sedema bîrokratîkbûnê ya bingehîn e. Piştî ku pêla şoreşger ya sedsala 20. di qada dinyayê de paş vekşiya û di heman pêvajoyê de wekî diyarker avahî û tevgerên kominîst, şoreşger, pêşverû, bere bere veguherîn rewşa dînamîkên
nav pergalê;mîna geşedanên jarbûna tevgera karkeran, avahiyên sendîqeyan yên heyî jî bêtirîn vediguherine perçeyek an jî dînamîkek hundirîn ya pergala kapîtalîzmê. Ev wekî pêvajoyekê di xebite. Çi kargerên
sendîqeyan çi hin partiyên karker û kominîst sendîqeyan wekî “
“rêxistinên civaka sivîl” dibînin û binav dikin ku ev jî hilberîna van geşedanan
e.
133
Wekî girêdayî hedefa sermayê ya bihêzkirin û afirandina civaka sivîl; hedefa hepskirina sendîqeyan ku wan derveyî siyasetê, tenê bi tekoşîna mafên aborî-civakî ve sînorkirî ango hedefa di “qada sivîl” de hepskirin, di berjewendiya bîrokrasiya sendîqeyê de ye jî. Di vê pêvajoyê de, bîrokrasiya
sendîqeyan jî di eslê xwe de lîstika demokrasiyê dilîzin. Wekî rêxistina sivîl ya herî mezin ya herî bi bandor ya li Tirkiyê TUSÎAD (Komeleya

Senayîvan û Karsazan ya Tirkiyê) bi israr gava ku pir behsa “jihev cihêkirina
qada siysasî û ya aborî” dike, heman karsazên TUSİD ê ji hukûmetê
bêtir rojeva siyasetê dişopîne û li gor xwe destêwerdana pirsgirêkên siyasî
yên herî girîng û krîtîk dike û helwestê nîşan dide. Qesda me ya ji lîstîka
demokrasiyê ev e. Bîrokrasiya sendîqeyî ya jor, gava ku karker siyasetê dikin,
“na tevlî siyasetê nebin, em rêxistinek civaka sivîl in” dibêjin, lê belê
gava pirsgirêkên “niştiman”, “memleket” hela pirsgirêka Kurd ku li rojevê
rûdinê, bi helwestek neteweperwer aledarîya parastina dewleta unîter dikin.
Guherîna di rejima kedê de û paralelî geşedanên teknolojîk, palû-
keyên mezin ku hilberîna girseyî pêk tînin û qismen biçûk bûne ku ew jî
geşedanek din e, li ser rêxistina sendîqeyî tesîrê dike. Lêbelê ev yek, di bitûniya
pirsgirêkên ku sendîqe rû bi rû ne, ne pirsgirêkek kilît e. Û îdîaya
“nêzîkahî li paşiya sîstema palûka hilberînê ya girseyî tê” rastiyê tam nî-
şan nade; ji ber ku hilberîn qerektera xwe ya girseyîbûnê didomîne. Trenda
geşedanê, berbi sîstema palûkê ya bi otomasyona bilind ve ye. Di vê
berîdayinê de, dê palûke, qismen biçûk bibin, lêbelê di mercên kapîtalîzmê
de hilberîn, dê karektera xwe ya girseyî biparêze.
Di pêvajoya hilbrînê de, ji dêvla keda jîndar, bere bere bêtirîn cihgirtina
keda daringîbûn (makînebûn, otomasyon); raberî biçûkbûna sektorên
senayî û zîreetê, paralelî mezinbûna sektora xizmetê, di yekgirtina keda
bimûçe de veguherîna meslekî ango ji berstûşînan veguherîna berstûspî-

yan, wekî trend geş dibe. Lêbelê ev trend “ji keda sipartî hêza mil, veguherîna
keda sipartî hêza serî divê neyê daxistin” ji xwe, di sektora xizmetê
de hem hêza berstûşîn heye û hem jî weke din, bigiştî hêza kedê ya di sektora xizmetê de, wekî daringî proleter dibe. Wekî din, ji ber ku di civaka
kapîtalîst de, sînorekî ku dê ototmasyon lê raweste heye, hêza kedê ya berstûşîn ya sipartî hêza mil, dê hebûna xwe bidomîne. Li welatên pêşve-çûyî yê dinyayê, ku lê, di hêza kedê ya berstûşîn de kêmbûnek diyar tê jî-
134
yîn rast e; lêbelê li parzemînên Amerîkaya Latîn, Asya, Afrîka, tersê vê hêna jî hêjmara berstûşînan zêde dibe. Tenê li Çîn, Vîetnam û li Hindê, li dora 1, 5 milyar hêza kedê, ji mêtingerîya sermayeya navnetewî re hatiye vekirin. Bi berstûşîn û spîyan ve heza kedê ya bimûçe, bi hêjmar biçûkbûn li dera han, mezin dibe, ligel bi piroleterbûna girseya berstûşînan jî,
ev dê mezintir bibe.
Di hêzwendakirina sendîqeyan de roleke girîng ya pêkanînên neolîberal yên sermayê û hukûmet dişopînin, heye. Sermaye ku, li pêşiya “azadiya aborîya sermayê” sendîqeyan asteng dibîne, ji bo ku wan bêtesîr bike gelek rê û rêbaz bikaranî, bikartîne. Xebata part-time, teşeronî, bikaranîna
personelên bi qewl, di heman baskê xebatê de, heta di heman palûkê de, pêkanîna cudatiya mûçeyên ku didin karkeran; gavên layenî perçekirina yekîtiya tekoşînê ya meslekî, aborî ya çîna karker e û tesîrê jî dike.
Çîna karker, girseyên gel yên kedkar û bigiştî bêmilk, xizan dînamîkên bingehîn yên veguherîna şoreşger yên sesala 21. in. Çîna karker û sendî-qe, li dijî van pêkanînên nû, di lêgerîna rêbaz û navgînên nû de, di qada

dinyayê de ji nû ve bihêzbûna tekoşîna çîna karker, dê di borîna pirsgirêkên
diyarkirî yên sendîqeyan de rolek girîng bilîze. Li dinya û Kurdistanê,
li dijî tevgera kedê ya nû, ku ji binî ve tê / dê bête geşkirin, sendîqe
an di hebûna xwe ya heyî de, dê guherînên bingehîn pêk bînin û bibin
navgînên tekoşîna çînî an jî wekî diyarker dê bibin hêza yedek ya pergala
sermayê û ev pêvajo dê kûr bibe.
Milîtaniyek kominîst û giyanekî kedkar di kargerîya sendîqeyan de nebe
perspektîfek di berîdan û çalakiyên piratîk yên rizgarîya çîna karker, dê
neyê serdest kirin; ji sendîqeyan, di geş kirina tekoşîna birêxistin ya çîna
karker de ji nû ve rol hilgirtin nayê payîn.
Di şênberîya me de, berpirsiyarî û wezîfeyek kominîstan ku di nava
sendîqeyan de xetek tekoşînê û meşek dûvedirêj himbêz bike û bisebr geş
bike, berpirsiyarî û wezîfeyek wan heye. Ancax, êdî em nikarin tenê di
meşa di nava sendîqeyan de, bes bibînin. Li derveyî sendîqeyan, lê ne alternatîfên
sendîqeyan, divê rêxistinên kedê yên nû jî bêtin afirandin ku di
vê babetê de berpirsiyarî û wezîfeyên me hene. Ji vê gûçê ve di demek
kurt de, li derî sendqeyan û di nava girseya karker ya herî li binî û di nava
girseya bêkaran de divê bête xebitîn û di vê xebatê de, gihîştina rêxistinên
kedê yên nû divê armanca me be.
135
PİRSGİRÊKA WERZEYÊ
Û RÊXİSTİNKİRİNA KEDKARÊN WERZEYÊ
Werze di asteke kûrewî de; çi ji bo mirovan çi ji bo ajalan, ji ber wesfa
wê ku pêdiviyên mecbûrî hildiberîne, ji nû ve tê rewşek stratejîk, dê

were. Wekî din werze, tenê ne ji bo kesên di vê qadê de dixebitin û ji bo kesên ku jiyana xwe girêdayî werzeyê didomînin, her wiha ji bo kesên li bajaran dijîn jî, xwedî giringiyeke jêneger e. Zanist, teknolojî, teknolojiya ragihandinê, di jiyana mirov û civakê de girîng in; lê belê vana, nayên xwarin, nayên vexwarin. Mirov, civak, ototmobîl, telefona dest, navgînên şer nebin, karin bijîn, hema bêxwarin nikarin bijîn. Ji ber vê sedemê, di serî de giringiya genim û çavkaniyên ava şêrîn, di qada dinyayê de mezin dibe.

Tevgera Kominîst ya hemdem, pirsgirêka herî zor ya di sedûpêncî salên dîroka xwe de ku lê rû bi rû maye û ya ji hêla berjewendiya çîna karker ve qadeke herî bi pirsgirêk e, di serî de werze û bernameya werzeyê

bûye. Bi taybetî li welatên ku bi şoreşa burjuvazî re lê reforma werze ya radîkal pêknehatiye, ev pirsgirêk bêtirîn bi êş tê jiyîn. Li xakê, bi taybetî li kargeriyên biçûk û navîn rakirina milkiyeta takekesî derdek, ranekirin jî mîna du derd, biye pirsgirêkek ji bo îqtîdarên sosyalîst.

Siyaseta sosyalîst ku li xakê milkiyeta taybetî bi temamî qedexe dike û hilberîna werzeyê, wekî milkiyeta gelemper û koman (kooperatîf hwd) ku pîlan dike, pêdiviyê, ligel bi bingehek teknîk ya bi hêz, bi têketinên teknolojîk,

di hilbrîna werzeyê de boşahî û curetiyê, pêdiviyê bi kombûniyek çandî ya komînal heye ku kare layen û hisreta gelheya çolterê ya bi milkiyeta

taybetî bihelîne.

Pêkanîna sosyalîst ku milkiyeta xaka mezin û hilberîna mezin ya werzeyê gelemper dike lê belê milkiyeta biçûk û navîn ya xak û hilberînê serbest berde, dê rê bide pirsgirêkên din. Pirsgirêka serî, meyla mezinbûna hilberîna biçûk e. Ev meyl, bi çanda çîna karker ya ku her cure milkiyeta

taybet didervîne dê di nav nakokiyê de be.
Li Kurdistanê şoreşa burjuvazî ya demokratîk pêknehatiye û wekî hilberîna
vê yekê reforma xak û werzeyê pênehatiye. Geşedana kapîtalîzmê
ya di werzeyê de wekî pêvajoye bi êş bi terza tekamulê geşbûye, bi
hêzbûye, paralelî vê axayên feodal yên xakê, di werzeyê de bi têketinên
136
teknolojîk berî dan hilberîna bi makîne û ligel ve jî bi bankeyên bazirganî
re jî di nav têkiliyan de, bûn tevlêbûneke aborîya bazarê ku ew pêvajo di
heman demê de bû pêvajoya ku axayên feodal bûn burjuvaziyên xak û
werzeyê. Di qada çolter-werzeyê de ligel ku li avahiya jor hin nirxên darazê
yên mîna adet, tore, kevneşopî didomin jî, raberî vê hilberîna werzeyê,
bazarkirin û di xeridandinê de ya serdest ji mêj ve ye, têkiliyên kapîtalîst
in. Eşîrên ku li zozanan li pey colan in, êdî bi rîya înternetê di
lêgerîna reklam û bazaran de ne, ya serdest ya aborîya vê çolterê, hilberî-
na ji bo bazarê ye. Projeya Başûrê Rojhilatê Enetolê (GAP) ku hewzeyên
werzeyê yên Kurdistanê diguncîne, vê pêvajoyê hem wekî ufkî hem jî
emûdî kûr dike.
Di serî de GAP avdana sûnî, bend û golet, di dema kurt de hilberdariyê
zêde dike, ancax di dema navîn û dirêj de, di xak û hilberîna werzeyê
de, rê dide / dê rê bide encamên ku telafiya wan ne gengaz bin.
Hevsenga ekolojîk xera dibe, ligel ku xak zû bi xwê dibe û dibe çol, xetereya
veguherîna araziyên bêadan ji niha ve li deştên Heran û Ceylanpinarê
dibe pirsgirêkek rojane. Senayîbûna werzeyê, adanê gelekî zêde dike,
ancax serzêdeyên daringî û antîbiyotîk xwezaya hilber û xwurekan xera
dike. Wekî din, ji bo li qadên werzeyê bêtirîn hilber bête bidestxistin,

bikaranîna ziblê çêker û dermanên kêzikan sewze, giya, ajal û bi navgîna wan, xetera jehrîbûna mirovan mezin dike.
Têkilî GAP ê miçilgeyên “dê refaha herêm û gelê herêmê zêde bike, talihê wê yê xerab biguherîne” rastiyê nîşan nadin. Bi pêvajoya GAP ê dewlemendî û xizanî bi xetên xuya di du hêlên dijber de sift dibe. Senayiya
sipartî werzeyê ya li herêmê, li Tirkiyê û Kurdistanê ji bo burjuvaziyê senayî û werzeyê, grûbên navnetewî yên bi wan re têkilîne, dewlemendiyê
li ser dewlemendiyê dike, para karker, gelê kedkar, gundiyên xizan û biçûk, xizanî, herî zêde bêsendîqe, bêsîgorte û bi kedek erzan dîtina karekî
ye.
Şerê di 20 salên vê paşiyê de tê ajotin, werzeya Kurdistana Bakur û bigiştî li qada çolterê ji kûr ve akam dike, heta tûşî ruxînê dike. Bombebarana çiya û çolterên Kurdistanê, bi navê “ziwakirina çavkaniyên qadên jiyanê yê gerîla” jehrîkirina çavkaniyên avên zozanan, şewitandina daristanan û paşê jî bi darê zorê valakirina gelheya çolterê, di qada ajalvanî û werzeyê de, demek dirêj encamên ku telafiya wan ne gengaze aniye holê.
137
Tekelên werzeyê yên welatên emperyalîst yên mîna YDA, Holende, Îsraîl, civakên Asya, Amerîkaya Latîn û Afrîka ji mêtingeriyê wêdetir bi armanca
ku wan bi birçîbûnê terbiye bike, ji sewze heta genim, bi tovên hibrît (stewr) bi xwe ve girê dide. Yekîtiya Awrûpa û IMF ku “pakêtên ahenga avahî” ku ferz dikin, di hilberînê de sînorkirina “kota” yê û rik û hişyariyên “krêdiyên werzeyê bibirin” bigiştî li ser werzeya Tirkiyê ligel wê, li werzeya Kurdistanê jî akamek neyînî dike. Rojava ya emperyalîst, li

civakên Asya, Afrîka, Amerîka Latîn, siyaseta “subvansiyona werzeyê rakin”
ferz dike, ligel vê, ji bo werzeya xwe jî subvansiyonê tim zêde dike.
Hilberînên werzeyê yên ji daxwaza hundir zêdetir bi dest dixe, bi subvansiyonên
bilind dajo bazarên derve û bi vê yekê reqabeta neheq geş dike.
Ewqas ku di serê salên 1990 î de li welatên OECD subvansiyona werzeyê ya salane 230 milyar dolar bû, bi hatina salên 2007 an ev reqem ji 300 milyar dolarî derbas bû. Mîna her qadên aboriyê, ji bo werzeyê jî gotina “lîberalbûnî” çîrok e. Tekelên werzeyê yên emperyalîst eşkere dibêjin “bi ya min bike lê, bi yên ez dikim, neke?
Bi taybetî di serê sedsala 21. de kominîst, layenên şaristaniya senayî ya kapîtalîst ku werzeyê li der dihêle, divê red bikin û binî xêz bikin ku werze û ajalvanî, zineetê herî kevn yê dîroka mirovahiyê ne. Di werze û xwurêkê de, ji alî serdestiya xwurekê ve, divê her welat, erdnîgar û civakên
biçûk yên herêmî serbixwe bin. Ev têrî xwebûn, ligel erdnîgar û herêmên din, divê hevborîn be û divê sipartî regeza hevtemamkirina hevraber
be. Wekî din gihîştina xwurekan, mafekî mirovî ye, pêwistiya hebû-na jîyînê ya biyolojîk e, bi yên xwedî derfet, nayê sînorkirin.
Ligel hemû van pirsgirêkên ku tên jîyîn, wekî kominîstên Kurdistanê, ma emê bilindkirina fiyetê zemînî yên hilberên bi kêra burjuvaziyê werze û xakê tê, yê ku ji bo bazarê hilberîna bi pîvek mezin dikin, biparêzin?
Na! daxwaza demkurt û hedef, ji bo rakirina bazirgan-qebal yên navbera hilbêr û xerîdar; rakirina çewsandinên tekelên werze û xakê ku ji alî dewletê
ve tên destek kirin ya li ser hilberîna biçûk û navîn; rakirina kontrol û

bandora tekelên werzeyê yên emperyalîst yên dinyayê; îptalkirina deyndarîya
banqe û bazirgan-qebal; û milkiyeta mezin ya xakê ku dê bi reforma
xak û werzeyê bête rakirin, em hedef digrin.
Di demdirêjiyê de wekî hedefa stratejîk, em çareserîya şoreşger ya ku
dê di xakê de, paşî li milkiyeta takekesî bîne ku çavkaniya hemû nakokî,
138
berberî, hemû xerabiyan e, bingeh bigrin. Di dema kurt de, divê bicîh
anîna daxwazên kedkarên werzeyê yên bimûçe û daxwazên hilbervanên
xizan û biçûk bête armanc kirin. Ligel vê, ligel daxwaza gelheya çoltera
ku bi zorê hatine bidûrxistin vegerin cîhên xwe, di qada werzeyê de teko-
şîn û birêxistin bête geş kirin. Vana di nava vatinî û berpirsiyariyên Tevgera
Kominîst ya Kurdistanê de ne.

YEKÎTİYA AWRÛPA, TİRKİYE Û PİRSGİRÊKA KURDİSTAN

Awrûpa, bi taybetî Awrûpaya rojava heta çaryeka paşî ya sedsala 20.
hem li hundir hem jî li derve (di asta navnetewî de) di bin pesta tevgara
kominîst de jiya. Şevreşka Kominîzmê li Awrûpa digerîya. Di eslê xwe de
dînamîkên pêvajo û pêvajo bi xwe ji vê hedefê dûr bin jî, bi kêmanî, di
xuyaniyê de tablo ev bû. Piştî şerê cîhanê yê duwemîn, wekî blok welatên
sosyalîst di sehna siyasetê de cîh girtin û li pey vê pêk hatina şoreşên Çîn,
Kûba, Vîetnam, rejimên Awrûpa ji çepê ve dipestand.
Di vê kişwera siyasî de, pêngavên Awrûpaya Rojava wekî “Yekîtiya Komirê
û Pola” gavên ewil yên Yekîtiya Awûpa ya niha avêtin, ancax nediketin
layena borandina sînorên netewî, sembol û nirxan. Ji ber ku tevgera
ked û kominîst ya navnetewî ku bi perspektîfek enternasyonalî û bi hêz
tevdigerîyan, her gavek di vê derbarê de bête avêtin, dikaribû ji alî hêzê
ve di qada Awrûpa de ji bo şoreşê bête nirxandin ku Awrûpa Rojava di

bin vê çewsandinê de bû. Her geşedanek ji bo mehandina netewetiyê, dikaribû
karê kominîstan hêsantir bike!
Ligel ku Sîstema Sosyalîst di serê salên 1990 î de ruxiya, pê re jî tevgera kominîst tûşî wendabûna hêz û miçilgeyê bû. Ligel vê, bigiştî ji par re ket, paralelî vê jî sermayeya Awrûpa û pergalên wê, ji bo demek kurt be jî, ji çewisandina "xeter?a kominîzmê filitîn. Sermayê bi hedefa borandina
netewîtiyê gavên "kûrewîbûn", "cîhanîbûn?ê şidand. Di van 15 salên dawî
de pêvajoya Yekîtiya Awrûpa, ji bo vê yekê bi gavên şid geşbû.
Li Awrûpayê, sermaye û pergalên wê bi hestên jixwe bawer û helbet ligel hin faktorên din, berî da borandina sînorên netewî, sembol û nirxan; ligel vê, tevgera kominîst jî wekî diyarker, dijberî vê, erozyona baweriyê jiya, ber bi hundir ve çilmisî, biçûk bû; di bin bandora van faktoran de xwe li pişt behaneya "YA yekîtiya sermayê ye" (û ev rast e) veşart û ket pozîsyona parastina sînorên heyî û dewleta netewî. Ne ji bo hemûyan be
139
jî, ji bo piraniya partiyên kominîst ev yek rewacdar e.
Ji bo siyaseta burjuva û ya kominîst, şoreşger ku tespîtên me li jor jê bahs kir, demdemî ye. Tekoşîna karker, bindest û yên tên mêjtin her ku li ser zemînên nû, ji nû ve teşe digre (daneyên wê yên ewil rûdidin) ligel vê teşegirtinê siyaseta kominîst, şoreşger pêk ve di nav hevakamekê de, her ku ji nû ve bihêz bibe û bi perspektîfek enternasyonalî, di qada Awrûpa û dinyayê de ji bo guherîna radîqal bibe aqtorên siyasî yên bihêz; dê an sermaya
Awrûpa mecbûrî vekişîna sînorên netewîtî - parastvaniyê bike an jî dê fersendê nede vê yekê û bi şoreşa Awrûpa an bi rêze şoreşên peyhev

dê bixe kûrahiya dîrokê.
Wekî tevgera Kominîst ya Kurdistan, li pêvajoya YA em pêşî wiha dinêrin. Têkiliyên YA û Tirkiyê, an jî pêvajoya Tirkiyê ya YA ji gelek hêlan ve gelê Kurdistan û siyaseta wê têkildar dike.
Ya yekemîn Kurdistana bûye çar parçeyan û parçeyê Kurdistan yê herî mazin diguncîne ji ber ku bi giştî bi îro ya gelê Kurdistan û dahatûya wê rasterast re têkildar e, pirsgirêka me kominîstan e jî.
Ya duwemîn; paralelî kûrbûna pêvajoya YA, ji ber ku dahatûya abarî, civakî, siyasî û çandî ya karker-kedkarên ji netewe û kêmarên Tirk, Kurd, Laz, Ereb, Ermen dê ji kûr ve akam bike, pirsgirêka me ye.
Ya sêyemîn; bi taybetî hilberînerên biçûk û navîn û ji layenê guncanî ve, ji ber ku dê akamek ruxîner li qada werzeyê bike, pirsgirêka me ye.
Ya çaremîn; Pêvajoya endametiya Tirkiyê ya YA, bi qanda ya sermayê, ya sendîqeyan, bi qanda ya neteweperwerîya Kurd ya çepê lîberal û heta bi êdî projeya rizgarî ya Îslama siyasî ye û bûye hêviya wan jî, ji ber vê pirsgirêka me ye.
Akama di van qadên diyarkirî de cot layen e; li gel hin akamên wê yên erênî, ji ber ku dê yekîtî di pêşengiya semayeya emperyalîst de geş dibe
neyînî û ruxîner e û her du layen dê di heman pêvajoyê de bête jîyîn.
Helwesta Tevgera Kominîst ya Kurdistan ya têkildarî pêvajoya YA, perspektîfek
bitûnî ya layenên erênî-neyînî digre berçav, têkveduxwe.
Bi giştî pêvajoya YA, bi taybetî pêvajoya YA- Tirkiyê bi asta ku niha gihîştiyê
de, divê di qada pratîk-polîtîk de em helwesta rasterast deynin.
Têkildarî pêvajoyê, wekî xetên bingehîn yê siyaseta ku dê kominîst bişopî-nin;

1- Dê bi zanebûn ku YA projeyek emperyalîst kapîtalîst e tevbigere.
140
2- Pêvajoya YA, digel me, di pêşengiya semayê de kûr bibe û nirx û sembolên netewî pere, al, sînor di leha YA de (wêdetirî netewî) jar bibe û
ev yek dê wekî pêvajoyê geş bibe; di vê pêvajoyê de, ji aliyekî ve li dijî armancên emperyalîst yên YA dê helwestê bigre, ji alî din ve jî di bunyeya YA de li dijî sermayê dê ligel tevgera ked û kominîst berî bida tekoşîna hevpar.
3- Bi heman nêzîkahiyê, di serî de di navbera Fransa-Almanya de, wekî pêvajoyek ku dê şerên xwînî yên navbera netewe dewletan yên li ser tevereya berjewendiya netewî dê ji par re bihêle, dê şertên daringî yên di
asta parzemîna Awrûpa de bihêz bike ku sermaye û kedê, bindest û serdestê
ku dê bi tazîtî raberî hev bike, dibîne.
Awrûpa ya ked û gelan, di qada dinyayê de, di şerê rakirina sînor û sembolên netewî de wekî gavek girîng dibîne û ji bo vê yekê têdikoşe.
4-Ligel ku helwest û rexneyên tevgera şoreşger ya Tirkiyê yên têkildarî wesfandina emperyalîst-kapîtalîst, bimaf û di cîh de dibîne, li dijî YA parastina
wesfa unîterî ya Komara Tirkiyê ku berîdan û helwestek çewt î ragirvan û parastvan dibîne û rexne dike.
5- Pêvajoya Tirkiyê ya YA, ku geş bibe û bi erênî encam bide jî, ev
yek, bigiştî ji bo gelê me yê karker-kedkar û bi taybetî rizgarîya netewî, civakî
ya gelê Kurd, de pêk neyîne, binê vê yekê xêz dike û di vê tevereyê de propaxandayê geş dike.

6-Wekî aborî, siyasî û çandî navendîtiya Awrûpa red dike. Di hin dînamkên siyaseta welatparêz, şoreşger yên gel / gelên me yê karkerkedkar
de û bi taybetî jî, di hin rewşenbîrên me de, ji heyraniya navendîtiya Awrûpa
wêdetir ku parêzvaniya wê têkveduxwe rexne dike, di vê layenê de hişyarkirina timdom wekî vatinî zane. Li şûna navendîtiya Rojava an jî Rojhilat, ji bo ji her lî ve sentezbûnek nû, hevdîtinek nû ya Rojhilat û Rojava
pêk were, herkesî gazî tekoşîn dayinê dike.

KAPÎTALÎZM, ŞOVENÎZM Û CİWANÎ

Vezena pêvajoya hilberînê, di civakê de geşkirina çanda qalibên xeridandinê,
kampanyayên ji îdeolojî û siyasetê re “na”, pîrozandina takekesîtiyê û paşî durûtiya “fersenda wekheviyê?; di civakê de, herî zêde li ciwaniyê
akamê dike. Ciwaniya Kurdistanê, ligel vana, bi encamên giran yên
ku siyaseta pergala nîjadperest, şoven ku li dijî gelê Kurd dişopîne re rû bi

rû ye.

Di civakên kapîtalîst de, siyaseta Keynesvan ya dewleta civakî li paş
hatiye hiştin û siyaseta neolîberal yên mîna vezandina rejima kedê, di piyaseya
kedê de jî, berebere taybetiyek bêpergal, neewle, part-tîme dide
qezenc kirin. Tu îro dixebitî, sibê tu karî bêkar bimînî. Ji bo karê bawerane,
perwerdebûyî, bitecrûbeyî, biwesifbûn jî têr nake.

Ciwanî, ciwaniya şagirt ligel xwendinê, di piyaseya kar de cîh digre û pê re artêşta bidîplome mezin dibe. Paralelî vê, li şûna ciwaniya bihêvî li dahatûya xwe dinêre, bixwe ewle cihê xwe ji ciwaniya ku cihê wê di piyasa
kedê de tim nediyar e, bêhêvî, bêewle re dihêle.
Di sefên ciwaniyê de, bi markayên bikartîne hatin nas kirin û grûb bûn ango bi navgîniya daringên ku tên xeridîn nasname bidest xistin, çi bigre ketiye pêşiya nasnameya netewe, malbat, çîn hwd. Qalibên hilberînê yên vezen, herkan, guherbar û hengavî bi pergala kedê î postfordîst re dibe dî-
namîka piyasa serbest. Civak, bi taybetî jî ciwanî, çiqas zû kevn bike û çiqas
zû biguherîne, dê hewqasî bizavê (dînamîzm) bide piyasê. Semaye û pergalên wê, ne tenê hêmanên daringî yên mîna lixwekirinê, xwarin, nirxên manewî yên mîna hezkirin, evînê jî ku wekî “bikarbîne bavêje” tê îfade kirin, kiriye tiştekî çanda xeridandinê ya kapîtalîst. Civak, ji alî xeleka zarokan ku nuxteyek şikestok ya civakê ye, digemirîne. Zarok, êdî ligel mêtingerîya kedê, wekî hêmanek reklamê jî tê bikaraîn.
Sermaye û pergalên wê, ji bo ciwaniyê hişyarî û berîdanên mîna “ji îdeolojî û siyaset re bêjin na û biheş (rasyonel) tevbigerin, dev ji rizgarkirina
cîhanê berdin, li xwe xelaskirinê binêrin, wekî takekesekî şîrket û dewletê yê sernerm pere qezenc bikin, zayendiya xwe bijîn” dike. Ligel ku hişyarîya, ji îdeolojî û siyasetê dûr rawestin li ciwaniyê dikin, ew bixwe di berjewendiya xwe ya çînî de nêzîkahiyek îdeolojîk û siyasî li ciwaniyê dikin.
Rêxistinên siyasî yên sivîl yên mîna mezringehên TUSİAD, kargerîya zanko, artêş, heta mizgeft, dêr jî ciwanan, ji ciwanên şagirt re “ji îdeolojî

û siyasetê dûr rawestin” dibêjin, lê belê ew bixwe, li hemberî her pirsgirêkek
cidî ya li ser welat û sermayê, bi helwesta îdeolojîk siyasetê dikin.
Semaye û pergalên wê di propaxandaya vegerî ciwaniyê de “her welatî, di mafê milk bidestxistinê de, di siyasetê de, li pêşberî dadgehê û di perwerdê de, wekhev e” dibêjin. Ev miçilge ji hêla teşeyî ve rast e. Ji bo xwedî milkbûniyê an jî wekîlbûniyê an jî xwendinê, li kutûga nîjada mi-
142
rov nayê nêrîn. Her welatî pêşberî zagonê wekî teşeyî wekhev e, xwedî mafê wekhev e. Lê belê di jîyana rastîn de xwedî milk û bêmilkî, bindest û serdest, xizan û dewlemend ne xwedî fersenda wekhev in. Zarokên karsaz
perwerdeya taybet digre û zarokê karker, yê azmûna zankoyê qezenc nekiribe lê karibe li zankoya taybet xwe qeyd bike û yê ji ber deriyê zankoyê
vedigere û tevlî artêşa bêkaran dibe, ne xwedî heman fersenda wekhev in. Wekheviya bi zagonan hatiye bidest xistin, di jîyana rastîn de hundirê wê hatiye vala kirin û hatiye teşeyî kirin.
Bujuvazî ku çekek propaxandayê vegerî ciwaniyê bêtir bikartîne, di pirsgirêka azadiya takekesî de jî ciwanî bi heman rewşê ve rûbirû dimîne. Ku civaka feodal ya siyasî serdest bi civaka kapîtalîst ya aborî serdest were
qiyas kirin, kapîtalîzm bi azadiyên takekesî tê ravekirin. Azadiya bidestketî,
ji bo karker xebitîn û nexebitîn an jî mafê guherina patron dide, lê belê ev maf, gava karker kar neke bi tehdîda ji birçîna mirinê ve sînorkirî ye, piştî vezandina piyaseya kedê, ji bo karker êdî derfeta guherandina patron

jî berbere ji dest tê derxistin. Heger azadiya takekesî, serberdayî, bêkar û birçî gerîn be, ciwanî bêtirîn ji vê para xwe digre.
Ciwaniya Kurdistan, di çewsandin û dorpêçkirinek ku wî tûşî ruxîna daringî û bi taybetî ya manewî dike de, tê dinyê-mezin dibe. Ruxandina heş ya ku ji perwerdeya bi zimanê biyanî pêk tê, herî zêde ciwanî, ciwaniya
şagirt dijî. Hedefa teror û çewsandinê ya pergala şoven, dîsa ciwanî ye. Girseya betalên bajarên Kurdistanê, bi piraniyek mezin ji ciwanan pêk tên. Dorpêçkirin û terora siyasî û aborî, bi adet û tore yên herêmî ve dibin yek, beşekê ber bi xwekuştinê ve kaş dike; ciwanî (bi taybetî keçên ciwan) bi rêjeyek mezin ya vê beşê pêktîne. Reklamên mîna “ez azad im” û bi promasyonan, helwestên mîna zayendiya ciwaniyê, azwerîya diravî tê qamçî kirin. Ev bombebarana reklaman, ligel xizmeta berjewendiya sermayê
dike, yekser an neyekser hilgirê siyaseta pişaftinê ya pergala şoven e.
Li cîhanê û li welatê me, ciwanî ya ku bi qanda daringî, ji alî manewî ve jî hatiye dorpêç kirin, vê dorpêçkirinê bi tenê û bi rabûna daxwazên xwe yên xwerû, nikare biqelêşe. Ligel ciwaniya karker ku di pêvajoya hilberînê
de ye, bi rêjeyek zêde dibe ciwaniya şagirt ku tê vekişîn pêvajoya hilberînê û pirsgirêka gelê karker-kedkar, li gora duh bêtir dikeve navahev.
Wekî lêzêde ji alî ciwaniya Kurdistanê ve pirsgirêka sereke ya azadiya ne-
143
tewî, jixwe bingehek hevpar ya gel û ciwaniyê ye. Raberî linavhev ketina pirsgirêkên aborî, civakî, siyasî jî qada tekoşîna ji bo pirsgirêkên xwerû yên ciwaniyê, bitaybetî yên ciwaniya şagirt, hebûna xwe diparêze.

Ev rewş; hem geşkirina tekoşîna xwerû ya li zankoyê hem jî rewşa borandina
sînorên zankoyê-xwendegehê ya ciwaniya şagirt, rojane dike. Li
gora duh bêtirîn daneyan pêşkêş dike. Tevgera Kominîst ya Kurdistan; bi pêwistiya dînamîzm û utopyayê divê ciwanî, ciwaniya şagirt ji nû ve ji bo "hewldana karên mezin yên ji serê xwe mezintir" ango rizgarîya gel, bi zanîn û hedefa îdeolojîk ku bi helwest û çalakiyên wî ve hatiye mêtin, siyasetê
bike. Divê li dijî pergalê ku dibistan, kantîna li zankoyê, pirtûkxane
û pansiyonê ku ji mekaniya civakbûniyê, siyasîbûniyê hatiye derxistin, têbikoşe. Ligel redkirina takekesiya biye mişraqa ezîtiyê ji bo afirandina kesê piralî û bihêz ciwaniyê gazî şer dike. Û di wê baweriyê de ye, vana, ancax ciwan ku nebin bendeyên çewtiyên xwe, li ser pratîka xwe xwenû-kirî, lêpirsî, dê karibin biserkevin.
144
**

DÎROKA KURDÊN KOÇBER 1

(Anatoliya Navîn, Xorasan, Sûriye, Rûsya)

-I-

Exil och flykting Kurdernas Historia

(Mellersta Anatolien, Khorasan, Syrien, Rysland)

Şoreş Reşî

Navnîşan / Adress

Înstîtuya Kurdî li Stockholmê / Kurdiska Institutet i Stockholm Mogârdsvâgen 13 143 43 Vàrby Gârd

Telefon

0046 8 38 81 12

Çapa Yekem / Forsta Upplagan

Tebax 2008 / Augusti 2008

Rûpelsazî

Xalidê Ezîz

Wêneyên bergê

Kesayetiyên Kurd

E-mail

kurdiskainstitutet@yahoo.se

soresresi@hotmail.com

Çapxane / Tryckeri

Berfïn Verlag

Köln

ISBN

91-976138-2-7

978-91-976138-2-8

Înstîtuya Kurdî li Stockholmê & Şoreş Reşî

NAVEROK

Dêstpêka Mirovahiyê û Coğrafya

Kurden Koçber

Di Serdema Kevir de Kurdistan

Koka Kurdan

Ari-Arvan-Arran

Navê Kurdan

Tofana Nûh

Xorrî

Mî tanı (Marîannî-Mêranî)

Gûtî (Kardû, Cudî, Gûtîyûm)

Hatî (HîtîtJ *

Mûşkî (Kurtî)

Sumer (Kengî)

Lûlû (Lûlûbuman, Lubîla)

Kassî (Kussî-Huza)

Asûr

Ûrartû (Bîa)

Med (-Medeîa/Arîan) û Pers (Artae)

Macar û Kurd (Saka-Iskît)

Tur-Turan u Sede-Smsmko

Zelanî

Çend Bûyer ji dîroka Kurdan ya piştî Mîladê

Mazda-Zerdeştî, Êzdatî û Elevvitî

Serdema Ereban

Serdema Ebbasıyan (749-1258)

Şerhi Idanên Xariciyan

Têkîlîya Kurd û Vîkîngan

Xorasan Weiatî Kê Ye?

Eba Muslimê Xorasanî

Mezhebên Cûda û Serhildanen di dû Eba Muslimê Xorasanî

Tirkmen-Oxûz

Selçûqî (1040-1157)

Ëlên Tirkmenên li Afyonê

Têkçûna Selçûqiyan

Di dema Osmaniyan de Tirkmen/Oxûz

Şadî

Danîşmendiyan (1062/1080 1177/1178)

Eretna

Qeremanî/Avsar

PEŞGOTIN

Xwendevanên hêja!

Di nivîsandina vê pirtûkê de min ji dû kaniyan sud wergirt: Yek, rehmetîyê bavé min Osé Erîfbû; tim digot: "Em jî Xorasanê û ji Xerpetê hatin." Ew gotin bûn destpêka lêgerînên min. Ya duyemîn jî têkoçîna azadîxwaz bû. Vê şoreşe, peşeng û lehengên wê di alî raman de bandoreke mezin 1İ ser min kirin ku di hundîrê min de vejînek mezin derket hole, Ew lehengana nebîyana ev pirtûka ji dernediket, ew şiyarbûn, bîr û bawerîyên mezin jî dernediketin û mümkün e îro em têketena xizmeta dîroka fermî... Jî bo wê spasîya wan herdû aliyan dikim û bejna xwe li ber wan ditewînim.

Ji bo wê jî ev berhemeka cüda ye, di beşa xwe de şoreşeke û bi perspektîvekî nu hatiyê nivîsîn! Hêvîdarim rê li ber nie a şen nû û dîrokê ji nu ve nivisandinê veke!

Yên ku vê nikaribin tahemûl bikin Ci xalîçê bin lingan hatî kişandî jî bi awayekî nû erîşan bikin... Bila bizanin ku roj bi heriyê nayê sîw'ax kirin û êdî Kurd xwedî rabûrdû û peşeroja xwe ne...

Min gelek hewd da ku agahiyan hîn berbiçavtir bikim, lê di vê rew^ê de ji destê min weqes hat. Bê guman kemasî hene, lê di vî warî de gava yekemin û ji bo xebatên peş bingeheke. Hêvîdarim ku xort û keç û dîrokzanên Kurd wê hîn peşdatir û nûjêntir bikin. Yekê jî ev karê zanko, înstîtû û komên pisporanan e. Ji bo kesekî derfetên xwe bi sînor re karekî giran e.

Ji bo ku Kurd bê dewlet in, heta niha li ser dîroka wan lêkolînên zanistiyê hatine kirin kêm in. Miletên serdest jî vê yekê firsend dihesibînin û li ser kelepûra me ya dîrokî rûdinên û dibêjin ya me ve... Hatina wan a Kurdistan® hîn hezar sal nebiyê, lê xwedî 1İ dîroka deh hezar sal Ci Sûmer, Hatî, Oxûz û Turkman derdikeve û dike male xwe...

Her ku ev lêkolîn kûr bû û min parçêbûn û trajêdiya Kurdan dît, kêfa min herimî. Kurd di pevajoyekî dîrokî gelek bi zahmet û dirêj re derbas bûne. Her ku mirov dikeve nav, fer dibe, yan giriyên mirov tê yan jî mirov bi hêrs dikeve: ku ça w a heta roj a îro ew wiha girtî û berovajo hatiye zanîn û nivîsîn. Birastî mirov gelek şaşmayı dimine ku ew xelka mecbûr bûyê serokên xwe yên serhildan kirî teslîmî nijatperestên misilman bike û pê cane xwe rizgar bike!... Gelek caran bira li hember bira dendstine û rûhiyeta wî gelî xirav kirine...

Gelo mirov dikare fêhm bike ku parçeyekî êlê li Xorasana îranê, parçeyekî li Lazqîyê û parçeyek jî li Navênda Anatole? Çawa dibe ku perçeyek ji êlê xwedî ola Zerdeştî, yek Elewî-Sersor, yek Şîa û yek jî Sünnî ye? Ew ji tirajediyê jî zêdetir e; şîne şîn! Şîna Kurda ye. Navê pirtûkê bibûya Şîna Kurdan belkî hîn rastir jî bibûya.

Ji vê parçebûnê re hêza min têrê nekir. Min nikarî herim her cîh û parçeyekî. Gelek sedemên wê hene: Maddî, dem, tirs, berpirsiyartiya bav bûnê û hvvd... Min karî tenê du caran herim Xorasanê. Careka din jî pêwîst bû lê min nikarî. Carekê çûm Gîlanê. Bi taybetî ji bo çûna miné Xorasan gelek kesan got; "Mere! Dewletê te bikuje!" lê min got bizanim, ku ewê min bavêne paşiya wesayitan û heta vir bi er de re kaşkine, ê var an di nav maran de rakevime û dê min bikujine jî ezê herim. Di serê min de tenê va lêkolîna temam kirin hebû û min çend caran ji xanima xwe re got: Eger ez wê temam nekim bimirim, çavên min ê vekirî herin! Bi rastı jî ez di gorê de rihet ne radizam û çavên mm ê li paş bimana. Li Bakûrê Kurdistanê gor îmkanan li herêmên Kolik, Meletî û Semsûrê hinek lêkolîn di cîh de kirin. Li beşekî mezin ên günden Anatoliya Navîn geriyam û ji kalan sûd wergirtim. Bi zor û zahmetiyan pirtûk dame tercüme kirin.

Di dîroka Kurd û Kurdistane ya dirêj de tenê ew pêkelokêke û heta pirtûkên ji vê baştir, berfirehtir û kûrtir derkevin ew ya gaveka li peş e. Peştebûna wê di îdeayên nû de ye: Heta îro digotin ku nivîsa kevirên Elegeşe ya Tirkan e! Heta ji desten min hat min li ber çavan raxist ku ew qala Kurdan dike...Dibêjin: Oxuz kalên Tirkan in... Lê min hewl da ku îspat bikim ew Kurdên li dervayî Welat in.. Ji bo Saka, Îskît, Peçenek, Alan û yên din heta roja îro ew bi miletên din re girêdidan... Lê ew kalên Kurdên îro li dervayî Welat in.. .Her wekî din digotin: Xorasan warê Tirkan e; cara yekemin Tirkan Anatol servegirtin; Germîyan, Qereman, Beranî û Pezgewr Tirk in û hwd gelek îdea yên bi vî rengî hene. Ev pirtûka di dest we de dîrokên li ser derawan hatî nivîsandin dihejîne û hewl dide ku vê yekê îspat bike. Di nivîsandinê de bi serketim an na ez nizanim. Eger bi ser neketibe kêmasiya min e. Lewra li ber min zahmetiya ziman jî hebû.

Li dij her astengîyên derketin pê§ min va pirtûka bi zimanê xwe kurdî nivîsand. Ev bi serê xwe serhildana hezar salan a li dijî dagirkeran e... Belê

ew em kuştin, koçber kirin, xwestin asîmîle bikin, lê biser neketin; ev jî bersiveka hezar salan e û parçeyek ji berxwedana Kurdên Koçber e... Min xwest pirtûkxana Kurd pirtûkeka nû qezencbike; xortên Kurd dîroka xwebizanin û serê wan bilind bibe. Berî her tiştî Kurd bigihêjin zanyariyeka gîştî û hevûdû baştir fêhm bikin; paşe jî min xwest bibim bersiva dagirkeran û penûsên dîrok berovejo kirine...

Dîroka Kürden KOÇ b er

(Anatoliya Navîn, Xorasan, Suriye, Rûsya)

Destpêka Mirovahiyê û Coğrafya

Gor zanîna îro, 6 milyon sal bere mirov ji çar pêyan derbasî jiyana du pêyan (Australopithecus-Ece Homo) bûne.(,98) Yanê mirov 6 milyon sal bere rabûna ser piyan û hû kirine ku mîna îro bire herin. Gor agahiyên nû tê gotin ku evê biye 8 milyon sal û mümkün e ku va zanîna rojeka din were guhartin bibe 10 milyon yan jî hîn zêde. Ji ber vê yekê dîroka kevne her tim di nava guhartinekê de ye.

Tê îddea kirin ku dîroka mirovahiyê cara yekemin, ji 6 miljon sal heta milyonek sal BI bi giştî li rojhilatê Afrika, ji Hadara Etiyopya bigre heta Taung a Başûre Afriqa, bi tavbetî jî li Kenya (Lohogam) û Etiyopya (Hadar) yê destpê dike. Du milyon nîv sal Bl mirov (Homo Habîlîs) bi komên çûk li dora gol û keviyên rûbaran jiyan derbas dikir. Ji 3,4 miljon salan vir de jî mirovan di alî girbûna mêjî û laş de jî ferqeka mezin peyda kir. Yanî 3,4 milyon sal BI hecma mêjiyê mirov 450 cm kûp bû, di 2,5 milyon salên BI de jî ew dibe 500 cm kûp û îro jî 1500 cm kûp e.(198) Di heman pêvajoyê de îskeletê mirovan jî tê guhartin. Di destpêka de îskeletê mirovan wek îskeletê gorîla bû û piştre hêdî hêdî hate guhartin. Di hema pêvajoyê de germ û serma dunyaye jî tê guhartin ku hemû bihevre girêdayî û li ser

hev bandorê çêdike. Tê zanîn ku mirovan cara yekemîn 100 000 sal beri îro, dest bi dengkirinê kirine û ramanên mîna roja îro pê§ xistine.(,99)

Nexşa Belavbûna Mirovahiyê

Homo Erectus di navbera 1,8 milyon û 90.000 sal bere de, ji Koobî Fora-Kenya dest bi belavkirina berbi bakûr dike. Ihtîmalekê mezine, ku mirovahiyê ji ber sedema zêdebûna nifûsê, kêmbûna avê û hişkbûne, berê xwe de welatên jor û dest bi belavbûnê kir. Li bakûrê Afrika bûn du şeq: Yek, berbi Cezayir û Ewrûpa (Spanya); yek jî berbi Rojhilata Navîn û Çîn çû. Hinek zanyar jî dibêjin raste rast derbasî aliyê Erebîstan bûn û li Rojhilata Navîn dest bi belavbûne kirin. Ve demé bakûrê dinyayê di bin qeşaye de bû. Yani: Bakûrê Amerika¬Kanada; Ingilîstan, Skandînavya, bakûrê Ewrûpa, Rûsya, Hindistan, Çîn û Qefqasya di bin qê§e de bûn.(66) Di roja îro de ew ditin hebekê hatiye guhartin, gor rojnama Swêdî SvD (2007.01.15/îngrîd Persson) di kovara Sciense-2007 an de radigihînî 200 hezar sal berê mirov li Afrika hebûne. Ji wir di navbera 50-60 000 salan berê dest bi belavbûne dikin. Nêzîkî 40.000 salan berê jî ewe ji dora Iran, Pakistan, Hindîstanê li dinyayê belav bûne. Lêkolîner ji kolînên li dora çemê Don gihîştine vê encamê. Mirov dikare bibêje ku ve demê li bakûrê Ewrûpa, Asya qeşa hebû û jiyan tunebû. Li başûre dinyayê jî ji ber germi, hişkî û pirbûna nufusê, gelan berê xwe da navenda dunyayê. Jixwe piraniya şaristaniyan jî li wir destpêdikin. Wekî Çin, Hindistan, Kurdistan, Mezopotamya, Derya Spî û Ba§ûrê Ewrûpa. Bicîhbûn, çandinî, ajal kedîkirin, ol, nivîs û hwd li wê xetî derdikeve holê. Ji ber vê, ji beşa li ser welatê me re dibêjin "Nîvhîva bi bereket/heyî".

Piraniya pisporan hemfikir in, ku dema Neolitik (bi cîhbûn, çandinî û kedi kirin) cara ewil li xaka Nîvhîva bi heyî de destpêkir; ji ber avûhewa û xaka baş nîv hîva bi heyî, ji Mezopotamya heta Dîlok, Deşta Amîkê û Çûkûrovayê pêk dihat.(,4) Çend sedsal beri niha ew şaristanî pêk hatiye,

lihevhatinek nine, lê gor texmînî ji ya li başûre Ewrûpa kevntir e. Li Ewrûpa, di şikeûûn Vallonet-Fransa de hate îspatkirin ku mirov 900.000 sal Bl li wir bi cîhbûne. Dîsa 300.000 sal berê li Moral û Ambona- Ispanya mirovên bi cîh bûnî hatine tespîtkirin.(,98) Birêz Ocalan jî dibêje: Civaka Neolitik cara yekemin li hundur û dervayê çeperên çiyarêzên Toros-Zagros de 12.000 sal BI derket. Li cîhên nêzîkî avê jî bi pê§ket. Sedema vê; kultura heywan û giya ji bo kedi kirin û rişandiru? müsait bû. Baranên mina avdayinekî tabiî hebû. Di dîrokê de şoreşa heri mêzin bicîhbûna mirovan e, ku li Çemê Hallanê-Batman, Çemê Kotê yê Erxanî û li Rihayê di gelêk girên biçûk de 11.000 sal BÎ pêk hatiye. Tiştekî dinî ispat bûyî jî eve, ku kaniya zimanê Hint-Ewrûpayê, esas hewzeya bakûrê Diclê û Firat e.(75) Iddeavên li ser zimanê Hind-Ewrûpa ji ali lêkolînerên Nyzeland Rûssell Gray û Qûentîn Antkînson ê ji Unîversîta Auckland jî tenê pejirandin. Di govara zanistî ya //Nature"-2003.11.27 an de dinivîsînin, ku zimanê Indo- Ewrûpa koka xwe ji 9000 salan berê ji Anatolê digire. Wana 87 zimanên Indo- Ewrûpa analiz kirine; bi alîkariya 200 peyvên di hemû zimanan de heyî, gihîştine wê encamê ku bakûrê Kurdistan dayika zimanê Indo-Ewrûpî ye. Bi dîtina min Kurdistan, ji destpêka dîrokê de biye goristana şaristaniya kalên Kurdan; ew yeka di bandora zimanê kurdî yê li ser zimanê dinyayê, navên

cografîkên henêmî yên bi kurdt (wek Ararat), bandora ola Kurdan yê li ser olên dinyayê û bi ser weqas împaratoriyên zilm li Kurdan kiri de jî, ne helandina Kurdan encamên ew şaristaniya mezin e... Di demên peş de ewê derkeve holê, lê niha ew derfet zêde nîne.

Tê gotin ku bi guhertina hewa, helandina qeşa û bi barana pir re di alî hey wan û heşinayî yê de gelek peşketin çêbûne. Ji ber vê gelên bi nêçîrê debara xwe dikirin li cîhên xwe sekinîn û zêde belav nebûn. Bi taybetî jî li: Başûre rojavayê Asya, devera çiyayî ya li Filîstîn, Kommagene, Anatoli

û Zagrosan zêdebûna baranê ya berbiçav û guhartina hewayê, bû faktorekî ku xwezayê; daristan, ajal zêde kirin. Gor zanîna îro ew guhartinan li derdora 13.000 salan BI pêk hatiye. Bi ser vê heyiyê de, êdî çêkirina gundan û bicîh bûn jî dest pêdike. Ew jî doré salên 12.000 BI ye. Ew bi serê xwe di dîroka mirovahiyê de şoreşek bû û piştî wê jî pêşketin hîn zûtir bûn. Ji 10.000 sal BI bi şûnde, li Sûriyê û Filîstîne gundên ji xaniyên qilot (gilover) çêbûn; ew xaniyên yekemîn tenê hesibandin.(198) Fêwîste mirov Kurdistanê jî li vê zêde bike, lewra kolanên tên kirin vê yekê didin xuyakirin û yekê jî hîn wekî tê xwestin kolandin pêk nehatine. Taybetî jî dewletên desthilatdar ji kolanên têkiliya wan bi Kurdan re bê îspatkirin ditirsin. Mînaka wê herî berbiçav, bendava Ilisuya (Germava) li Heskîfê ye... Ev yeka ji alî M. Akar ve ji bo Semsûrê tê gotin: Li herêma me, mirov 12.000 sal BI derbasî jiyana malan bûn. Malên qilotikê yek odeyî çêkirin û §ikeftên Palanî wek xanî bi kar dianîn.(85) Xaniyên li Haranê ne ku ji wan re "Konik" tê gotin jî dişibînin vana.(85) Bi baweriya min piranî li dora çemên Nil, Dicle, Firat û Hindûş ev gundana çêbûn. Şaristaniya mirovahiyên yekemîn li wan deran ava bûn. Bajar, gund çêbûn, rişandin pêk hat, alav hatin çêkirin. Li Çatal Hoyukê di 6500 sal BI gund çêbûn û ev malên li wir hatinî çêkirin bi yên Anatoliya Navîn ve pir nêzîkî hev in. Li Semsûrê (Perre/Pirîn) alavên malan yên ji keviran 150-100 sal BI çêbûnî di şikeftûn de hatin dîtin.(85) Ew jî yek mînake ku Kurdistan yek ji cîhê nişteçîhbûna mirovahiyê yekemîn e.

Hinek nûser heykelên kevne li Misir bi şaristaniya Kurdan ve girêdidin. Gelo Kurd berî bên cîhê niha li Misir man û li wir şaristaniyek avakirin û piştre derbasî bakûr bûn? Sfenks-heykel (li Qehîrê) di serdema Şêr de, di navbera salên 10970-8810 BÎ de hatiye çêkirin û ji çandeka pêşketî (Kurd-Ş.R) ya berê li Misirê jiyaye ma ye. Ew mîmariya hanê ji mîmariyên ji wê bi şûnda hatî hemûyan pê§vatir e. Têkiliya wê çandê bi yên li Çatalhoyuk

û Kurdistanê ve heye. Ihtîmaleka pir mezine, ku Kurd ji vê deverê (Misir) ber bi bakûr belav bûn.(159'4ü9) Nivîskar di vir de işaret pê dike ku Kurd berê li wir xwedî şaristanî bûne, piştre bi afatên xwezayî û gor baweriya wê demê bi cezayê xwedê ew ji wir derketine û ber bi bakûr hilkişîne. Mirov dikare di vir de mînaka Xwedayê Misrê yê bi navê "Ra" bîne bîra xwendevanan. Ku, navê Xwedakî wiha girîng îro jî Kurd ji bo rojê bi kar tînin û pîrozbûna rojê ya nava Kurdan tê zanîn. Li Anatoliya Navîn Kurd hîna jî ji rojê re dibêjin re/ro. Di alî hinek kevneşopiyan de jî Misrî û Kurd wek hev in. Wek mînak: Xwedayên Misriyan 12 heb in

û êlên Kurdên li Anatole jî wek 12 tên parve kirin. Dîsa hinek edetên li ser eznîlixiyê/§înê (rû berdan) û rola ga yê di nava civakê de hinek ji wan in. Evv kevneşopiyana ne nû ne, divê ji demên kevn ve mabin û ne dure ku dema nivîskar qal dike be.

Bajarê bin erdê

Di çirokên kevn de tê gotin: Insane ku Xwedayê rojê Re (Ra) gelêk kal didîtinî, ew ji hole rakirin. Çîrok wiha ye: "Bave Ra derbasî cîhê wî bû. Wî agir û tîrên ku İaşe dijmin qûl dikî û ji holê radikî avêt (volkan), dijminên nêzîk dibin qewirandin û İaşe wan şewitand..." Ra bane Xwedayê erdê Geb kir û jê re got: "Ronahiya te ew marên ketine qûlan ma derxe. Va dixwaze pê işaret bike, ku ewên reviyabûn ser çiyan û ketibûn şikeftan derxe... Tê ve watê ku ew însanên pişta xwe danî Ra êdî li hinek navendan nayêne xwestin (Misir). Van însanên mina mar yen di çîrokê de derbas dibin, dibû ku mirovên li Kapadokya (Kûyûlar-6500 sal BÎ) û mirovên li salên 9500-9000 BÎ de çûnî çiyayên Kurdistanê û wira ji xwe re war girtinî ye mîna maran bin? Li Misir zireata kevnar di sala 10500 BÎ de ji nişkeva qût bû û pişti 1000-1500 salan BÎ de li Kurdistanê dîsa derket holê. Va jî têkiliya ve goçê nişan dide. Yanê, mirov ji ber volkanan û agirê ji ezman dibarî reviyan û baweriya agir jî ji bîr nekirin. Vê yekê li ser baweriyên

Asya Biçûk û nêzîk bandorêk çêkir û baweriyên li wir parçeyek ji wê çande ne. Di nava vvan de proto-îbranî û Hînt-Îran jî hebû.(159'

419)

Dîsa di dîroka mirovahiyê de bûyera wek şoreşeke girîng jî 10.000 sal BÎ mirovan dest bi xwedîkirina ajalan kirin bû. Bê guman ji her alî de ew peşketineka mezin e. Ji alî zêde kirina: ji şîr, goşt, posté wan; ji firotina wan

îstîfade kirin û ji alî bi cîhbûna mirovan de roleka girîng list. Bi vê re girêdayî zîreat jî bi pê§ket. Tê zanîn, ku 8500 sal BI li wir çandinî hatiye kirin.(1<W) Bi taybetî jî cîhê ku îro Kurd lê belav bûnî, Israîl, dora Nîl, Yewnanîstan û xeta perava başûre Ewrûpa cîhên ku cara yekemîn çandinî hatiye kirine. Li Ewrûpa ew yeka BÎ 2000 salan de pêk tê ku ferqeka mezine û di alî afirandina şaristaniye de jî peşveçûneke mezin e.

Li Kurdistanê, hate îspatkirin ku mirovên 12.000 sal BI derbasî jiyana nişteclhî û çandinê bûne. Kolanen li Ça¬tal Hoyûkê hatî kirin didine îspatkirin, ku mirovan 9.000 sal Bİ xwarinê xwe goşt bûye. Ji sedî 90 ji pezên kedî peyda dikirine û şîr, mast û penêrî peyda di- kirine. Mêr 1.70 cm, jin jî 1,55 cm dirêj bûne; mêr 32, jin jî 29 salan dijiyane. Eğer em vana hemûyan bigînin ba hev, derdikeve holê, ku xwedî kirina pez û çanda pez li cem Kurda ji her miletekî zedetirê; pir kevne û bi kemasî 15.000 sal in berdewam dike..

Li Tepe Serab-Kirmanşahe kolanên hatî kirin de gundekî 10.000 sal BÎ hatî avakirin peyda bû. Malên gund di bin erdê de ne; banî ji bi daran û xaliyê hatiye porkirin. Di malan de genim, ceh û alavên ku vana dikî erdê hatin dîtin (4). Ku ew forma xaniyan bi "Tolik" ê li Anatoliya Navînê berê bikar dihatî ve wek hev in; ew yeka him ji alî şekil ve him jî alî termê ve nêzîkî hev in. Li Rihayê ew Konikê li Anatoliya Navîn jî Tolik e. Ti guman tune ku

bingehekî wana yî dîrokî û civakî hevbeşî heye. Li ser xaniyê bi vî rengî li Anatolê bûyereka trajîk ê li gundê Tirko-Haymana pêk hatî tê qalkirin. Mezine me digotin: "Dema koçberiyê, gundê Bûldix (Reşî) li cîhê gundê Tirko îro bûye, mala B.... ya ji Reşiyan, ji ber deyn vê malikê ji xwe re wek xulam bi kar dianiye. Evarekê malê di tolika xwe de ramedî ye, keçika malikê mezin jê wek berbûk (berbûç) çûye daweteka gund. Bi şev baranê hûr hûr heta seda bari ye. Xaliya li ser tolikê şilbûyî yê giran dibe û stûna bin tolikê dişkâne. Di bin de heft kes dimirin. Sibe keçik ji dawetê tê ku mala bavé ya di bin tolikê de mirine. Dest bi §inê dike û dibeje: 'Malê li we here li neviyên we nere!.." Iro jî ew heft goran (mezelan) li gundê Xabûra li keviya rê ne. Piştî demeka dirêj, di avakirina xaniyê di vê formaté de jî êdî tê guhartin şiklekî nû derdikeve holê, ku hina jî ew sîstema li gelek deran berdewam e. Li Kurdistanê malê bi vî rengî 7.000 sal BÎ tên dîtin ku ewê: çar köşe, binî bi kevir, serî bi kerpîç hatine avakirin û ewê hatiye tespît kirin.

Kürden Koçber

Di destpêka vê xebatê de her çiqas armanca min tenê dîroka Kurdên Anatoliya Navîn bûn jî, her ku xebat kûr bû min dît ku ew armanceka nîvçe ye. Yanî mirov nikare tenê xwe bi Kurdên li Anatoliya Navîn bi sînor bike. Lewra birayên wan en ku li cografyayên din dijîn jî pêwîst bû bên nivîsandin. Ew coğrafya jî pir fireh e: Ji Hindîstan bigre heta Herat, Belûcîstan, Xorasan, dora Derya Kesk, Qefqasya, Erzirûm, Qers, Dêrsîm, Semsûr, Meletî, Riha, Dîlok, Mereş, Helep, Lazqiye dirêj dibe. Bê guman Anatoliya Navîn, yanî: Kurdên Enqere, Kirşehîr, Qayserî, Aksaray, Qonya, Yunak, Polatli, Eskîşehîr, Haymana yê dikevin nav û Kurdên li dora şerîta Derya Reş û yen li Adapazari jî dikevin nava lêkolîna me. Ev Kurd xwedî dîrokeka hevbeş in. Ji bo vê jî vana wek "Kurdên Dervayê Welat" yan jî "Kurdên Koçber" bi nav dikim. Ji bo wê, dema min Kurdên Koçber nivîsîn,

mebesta min ewe; ku Kurdên di nava wê coğrafya yê de bên fêhm kirin. Ji ber ku dîroka wan kêm-zêde, nezik û dur bi hevra girêdayî ye lû ji hev veqetiyane, tevlî hevbûne...Heta mirov dikare bibêje; ku Kurdên îro kurdiya xwe xirav bûne-şikeştine yan jî nikarin xwe bi zimanê dayik baş îfade bikin, dikevin nava vê çerçova coğrafî ya min tarîf kirî...

BÎ Hejmara Mirovan

Gor tespîta ku zanyarên îro kirî, 4.000 sal BI li ser coğrafya Kurdistanê 5 milyon; li Çîn 3,4 milyon, li Hindîstanê jî di navbera 400-600 hezar mirov dijiyane. Eger di navbera Çîn û Kurdistan de muqayesek bê kirin, te dîtin ku mirovên li Kurdistanê zo bi zo ji yên Çîn zêdetirin. Heta li Hindîstan mirov pir kêm in. Dîsa gor heman zanyaran hejmara mirovan li destpêka mîladê wiha ye: Coğrafya Kurdistanê îro nêzîkî 20-24 milyon; li Hindîstanê 44 milyon li Çîn jî nêzîkî 64 milyon dijî ye. Gor heman jêderê di navbera 8.000-6.500 sal BÎ herêma herî zêde mirov lê dijiyayî dîsa Kurdistan, Misir û Anatol e. Di navbera 6000-4000 sal BÎ de jî xelk li Balkan, Ûkranya, navenda Ewrûpa belav dibe. Di 4500 sal BÎ de jî li Yémen xelk tê dîtin.(6639) Çima li Hindîstan û Çîn mirovatî weeps zêde û li Ku rdistanê jî kêm bû? Eger Çîn îro ji milyarekî zêdetir e diviyabû li Kurdistanê îro 3-4 milyar hebûyana... Sedema wê çi bû?

1- Pirbûna nifûsê û şere nav mirovan.
2- Parçebûna komên mezin (Arran-Hînd-Ewrûpa)
3- Xweza ji bo jiyana mirovan li heiêmê din baştir bû.
4- Hatina netewên dinê wek Ereban.
5- Tofanên xwezayî.

Mirov dikare gelek sedemên din jî lê zêde bike. Bê guman mirovên li wê cografyayê hemû ne Kurd bûn û koma Arranê wê demê hîna jî tevhev

bûn û serhejmara wan jî ne hindik bû. Heta mirov dikare vê yekê jî bibêje, ku Kurdên

weqas komkujî, parçebûn û belav bûn di serî re derbasbûnî eğer dîsa jî li ser piyan mane û serhejmara wan îro jî zêde ye xerê, sedema vê yeke yek jî ew bû, ku serhejmara wanê dîroka kevn hîn zêde bû. Bi qêtîn û helandina ew jê man. Yanê gelek gelên îro cüda xuya dikin ji Kurdan veqetîn. Ew yeka jî mezinbûnû bi kok-binatiya vî netewî nîşan dide. Yekê jî eğer ew sedsalên dawî dewleteka serbixwe avabikirana îro dikaribû serhejmara wan du caran ji ya îro zêdetir bibûya.

Nifûsa Mirovan 4000 BÎ

Li ser wê dîtina profoserê Unîversîta Ûmeo I.ars Bacmanê swêdî di lêkolînê xwe de encamên balkeş derdixe hole: Lêkolîna li ser DNA yê 1007 kesên ku niha li Ewrûpa dijîn hatî kirin de derket holê, ku ji sedî 80 kesan kromozonê xwe ji Rojhilata Navîn tên. Yanî ji 100 kesan 80 kesî bi eslê xwe yî ji kesên li Rojhilata Navîn nêçîrvanî kirî hatiye. Profesör vana dike du beş: Yekê, 40.000 sal berê ji navenda Asya hatine bakûrê Fransa. Ya duyemîn jî, 25.000 sal berê ji Kurdistanê çûne Balkanan. Ji sedî 20 kes jê 9000 sal berê ji Rojhilata Navîn hatine (DN-2001 Asiater forsta vesteuroperna). Ew lêkolîna jî îddeayên li ser serhejmara belav bûyî û kaniya zimanê Arranî dide destek kirin.

Ji 100/80 kesen iro li Ewrûpa dijîn, koka kromozonê xwe "y" ji gelé nêçîrvanî ji Asya Navîn û Rojhilata Navîn hati girt! ye.

Mirovén yekemin li Ewrûpa

Di Serdema Kevir de Kurdistan

Kurd netewa 1İ Kurdistan, Mezopotamya û Rojhilata Navîn ya herî kevn e; lê mixabin heta îro ji bo ku nebiye hêzeka siyasî ya mezin, ekonomik,

eskerî û desthiladarê li ser axa xwe, li cîhane cîhê pêwîst negirt. Heta roja îro kolan, lêkolîn û belgeyên ku şaristaniya vî miletî bi peşxistî ye peyda nebûne. Yen ku hatinî derxistin jî ji aleme re eşkere nekirine. Ji her aliyekî ve erîş û dizi li ser çand û şaristaniya wî netewî heye; lê hêviya me ji vir pêde zêdeye û di serî de xortên Kurd û alimên bê alî ne, ve ronehiya Kurdan derxin hole. Yek ji wan lêkolînerên hêja jî birêz Andrew Collînsê ku ji pirtûka Kurdan yê pîroz Avesta wiha radigihîne: " Şanse ku Ahûra Mazda, navdar û rû xvvesikê Yîma hîşyar kir, hîn ew serina dibirî nehatibûn. Ahûra Mazda bi wî re got: Di bin erdê de "War" e kî çêke û ma bi çar aliyan de here. Ji her cure ajalên mezin û biçûk, ji manga, ji heywanên bêr/bar (ker,hesp), ji însanan, kûçikan, çivîkan/mîrişkan û ji are vêdikevî bîne û li War bi cîh bike!

War- Den

Got: di nava wi Wan de ava dixusi çeke. Li keviya ave; çere, daran u

çahiré birşme (biçme) u çivikan ewranlebi cih bike.Li wir ji şıtlen hemu meywe

U sebzeyan dikanî birşinı (biçîne). Ew hemu heywan u nesne dema ku li nava

wi War i de man, şivane dilxweş re hat gotin ku ew tu caran rizyayı nabin.

Pişti çend zikan (nitşan) ew serma hane çu u Yıma insan u heywanen Irane ji

wir derxistin u disan bîr dinyaye. Bi vı awi dünya di saya Yıma ye küre kra

Tahmuras de rizgar bu. Va çıroka Yıma ji kevneşopiva Zerdeşt u di lıtaretura

Avesta de batiye gotin, ku muhtemelen heta sedsala VT an Bl te re. Di vır de

cııdahı di navbera ve u tofana Nuh de heye. Vekirı te gotin ku bajarekı bin erd,

yane War e kı çeke. Kem itiraz hene ku va serma ye di navbera salen 15.000 u

8.500 an de pek batiye. Ahura Mazda ji krale ruxweşik re dibeje taxa jor neh

kolan, dı a navın de şeş kolan, dı ya bin de ıı se kolanan çeke. U gotıye: taxe ıor

1000; li ya navın 600 li a bini jı 300 jin u meran bi cıh bike. Te wata 3800 insan.

Di tekste de cıhe wi War ı mixabin tune! Beigeyen li Çatalhoyuke derketine,

ispat dike ku kal u baven (Kurdan) we çande li wir jiyane.

Qata Sêyem: Di vê qata şikefta Şaneder de berhemek ji kevirên hesteyên vê serdemê wekî tevir û kevirê tûj jî tên ditin û tu nîşaneyek ku mirovê destpêkê çandinî kirine nayê dîtin. Dîroka wê vedigere ser Serdema Kevirîn a Nû. Mêjûya vê katê 30.000 sal e û bi xwe jî 'Hunera Biradost' e.

Qata Duyem: Di vê qatê de, berhemên ji Serdema Kevirîn a Navîn wekî kêr, rende û gurzên kevirîn tenê dîtin. Lê berhemên vê serdemê ne tenê yên sikefta Şaneder in belkî li şikefta Zerzî ya nêzîkî bajarê Silêmaniyê û şikefta Hezermêrd ku dikeve 15 km başûre Silêmaniyê jî hin berhemên vê serdemê hatine dîtin. Her wiha di sala 1954 -1955 an de ji aliyê Prof. Biraydûd ve li şikefta 'Balî Kure' ku dikeve 15 km rojhilatê Çemçemalê û şikefta 'Kîwaniyan' û 'Badak' ku dikevin başûre rojavayê Rewandûzê jî hin berhem hatine dîtin. Hin berhemên vê serdemê li şikefta Bîstûn jî hatine

dîtin. Her wisa li şikefta Kurîn ku dikeve bin desthilatiya Tirkiyê jî hin berhem hatine dîtin.

Qata Yekem: Pir berhem di vê qatê de hatine dîtin û hêza mirovên vê serdemê di afirandin û çêkirina alavên kevirîn ên rengareng û xweşik de derdikeve holê.

Kûyûlar

Hatiye dîtin ku 6500 sal BI li Yarmo (biné Zagrosan û sînora başûre Kurdistanê) 25 mal hebûne û 150 mirov lê jiyane. Ev mirovanan bi xwarina goştê beraz, mî, û bizinan dijiyane. Koçberiya yekemîn ê li vî gundî di 6000 BI de dest pêkiriye. Vê demê van gundiyana têkiliyê xwe bi Şanidar, Palegawre, Kirmanşah re hebûne û ji wan hîn moderntir bûne. Vê demê ji malê xwe ra bi heriyê ocax (kuçikan-tifikan), kervê aşa û sepêtê çêdikirine. Tişte din î balkâş jî ewe ku vana tekiliyên xwe bi kesên li Çayonu (Erxanî) dijîn re jî hebûne. Kesên li Çayonu ye jî ceh dirşandine (tov dikirine), sifir bi kar dianîn, tîtikê sûsê çêkirine û herdû kultur berdewamiya hev in.(,0) Ew alavên derketinî didin îspat kirin ku ew çanda yek e, dîsa gor pelgeyên dinê hatinî bi destxistin têkilî û nêzîkbûna çandên li Kafqasya, Loristan û Helebê heye ku ew jî belavbûna Kurdan ya BI dide nîşandan.

Koka Kurdan

Li ser kok û géra Kurdan yê li ser rûyê erdê gelek teorî û dîtin hene ku wana jî hev gelek dur in. Rehmetî Cemil Paşa dibêje: Kurd, ji nijadê endo-ewropî ne. 10 hezar sal BÎ ji Skandînavya bi sedemeka em nizanin koç kirine hin deverên li Asya û Ewrûpa servegirtin. Kurd gava gihîştin Ararat bûn du tîş: Kutî û Kurtî.(S>'27) Kesên wek Walter Scheefussjî dibêjin: Ji bakûrê Almanya hatin; ji alî zanistî, xwezayî û mantiq ve pûç derdikeve.

Hinek kesên mina: C. Burney jî dibêjin ji Ûkranya û başûre Rûsya hatin(4) jî mirov dikare li ser zêde niqaş bike û girêdayî qala kîjan katê têye kirin e. Li ser wê emê di rûpelên peş de bi taybetî li ser dema Saka-Iskîtan de rawestin. Berovajî vê, gelek nîşane hene ku mirovahiyê ji Rojhilata Navîn, Asya Navîn û Başûre Rûsya belav bûye. Lewra, li jor jî me qal kir, ku dema jiyan li Kurdistan geş bû, li bakûrê Ewrûpa û Skandînavya yê di bine qeşa de bû. Ji bo wê ne mümkün e ku Kurd ji Skandînavya hatibin. Yekê jî tu tevgerên bi vî rengî nehatine tespît kirin û di beşa nifûsê de jî min destnîşan kir ku piraniya mirovahiyê li xeta Çîn, Kurdistan û Fransa de belav bûne.

Dîtina din ê li ser koka Kurda jî ji alî Viladîmîr Mînorsky ve tê îddea kirin ku dibêje: Kurd ji Medya Biçûk a li Atropatanê (Ezerbeycan), li sala 700 BI belavbûn.(12) Dîtineka bi kêmasî ye. Lewra Kurd miletekî mezin in, beşekî ji wî netewî mezin î ku pêsengiya wan kiri, yan jî mora xwe li dîrokê xistî û ketî ser nivîs û belgayan ji wir belav bûye. Ew raste lê ne hemû Kurd in. Yekê jî mirov dikare bipirse gelo Kurd beri vê demê li kuderê bûn? Lê hema nivîskar wexta li ser zimanê kurdî şirove dike, bi xwe re dikeve nav nakokiyê: Di bingehê kurdî de zimanê civateka girîng heye. Karektera xwe giştî, berî Kurd herin ser çiya hatiye avakirin.021 Bi rastî ev niqteka gelek gelek giring e û dide îspatkirin, ku Kurd milete herêmê ne û ji ber ûrîşan mecbûrê çiyayan bûne. Bêrî wan erişen dijwar jî xelk li hîva bi bereket nîştecîh bû.

Prof. Marr jî îddea dike ku: "Karduk (Kurd) û K art (Gurcî) di destpêka dîrokê de yek bûn. Kurd nîştecîhe çiyayên Asya Biçûk ê (Anatol) eslî ne û zimanê kurdî li wir ava bû. Kurd bi Xaldî, Gurcî û Ermeniyan ve meriye hev in û zimanê wan deng dikirin; paşe zimanê Irani qebûl kirin(2'41). Li gor kevalên kilsê yên Sumerî yên 2000 sal BI, welatekî bi navê Kar-da-ka hebu ewê li kêleka Gola Wanê û li keleka welatê Xelkê avê bû.(2)

Lehman Haupt dibêje: X/Haldî mihacirên ji rojava hatine.(,42'2) Ji bo ku Ermenan bi Xaldiyan ve wek hev dibîne wiha dinivîse. Bi dîtina min ne yek in. E. Mayer jî dibêje: niqta wanê ku jê derbasî tevgerê bûnî nava Çemê Aras e. Bi hatina (sedsala VII) Ermeniyan re Xaldî berbi çiyan belav bûn.(l422) Hinek nûser û jêder Xaldiyan wek Ermeni nîşan didin. Rast e, Ermeniyên ji rojava, ji dora çemê Tuna, yan jî bakûrê Yewnanîstanê hatine tê gotin, lê bi dîtina min eve bi Xaldiyan ve jihev cûda ne. Xaldî gelé bakûrê rojavayê Kurdistan in û bi hatina Ermenan re wan cîhên xwe terk kirin. Bê guman ew karê dîrokzanan e

le ne dûre ku Xaldî kalên beşek ji Kurdên îro li Dervayê Welat bin. Bi taybet jî mirov dikare bibêje ku kalê Kurdên Celali, yan jî Xelikî yen îro belav dijîn e. Gelek işaret hene ku ew Kurdên Xelikî ne.

Hinek jêder îddea dikin ku Gurcî ji milêkî Xorriya ne. Ji kolanên li Gurcistanê hatinî kirin de, alavên ji 5-4.000 sal BÎ derketinî ye bi tiştûn ji Derya Spî, Sûriye û Filistin ê derketî ve hevdû digirine. Motîfên li Gürcistan û Loristanê 4000 BÎ derketinî jî gelek dişibînin hevdû. Gorî Gordon Childe ewana ji alî qebîleyên hov ên ku ji Gurcistanê hatinî ve hatine wan herêmana.(47) Gorê lêkolîna Aynûr Ozfiratê li ser bajarê Haranê de ewe vê tespîtê dike: 3000 sal BI kultura li Mersin, Urmiyê, bakûrê Sûriyê, Ras Şamra ye hevbeş biye.(54) Ew deverên cografîk yên ji hev dûr, di dirêjiya dîrokê de herdem bûne cîhê Kurdan. Bi dîtina min, sînorên cografîk ê Kurdan di dema BI de, ji Qefqasya û dora Derya Kesk heta Xelîca îranê, ji wir jî heta Mersînê ye. Li rojava sînor zêde ne kifş in, lê ez di wê baweriyê de me ku beşekî Anatola mezin jî di navê de ye. Eger Kurdbûna Hîtîtan bê îspatkirin wê demê, Anatolû bi tevahî dikeve nava wan sînoran.

Di ansîklopediya Islamê de tê gotin: ku Cyrtî-yan (Kurdên Iranî) çawa li rojavayê welatê Karduyan î kevn Zagrosan nişteciîhbûn? Serkeftina Med

û Iraniyanbû sedema cîh guhartina qewmên Iranî.(,42 4i Raste milête Arran belav bû, lê bi ditina min belavbûna herî mezin di dema Ereb û Asûriyan de pêk hat. Kurdên ku ji welatê xwe derketinî bi serkeftina Medan re li cîhên xwe yên berê vegerîn. Bê guman belavbûna Meda jî roleka girîng di vê babetê de lîstiye. Heman jêder li ser belavbûna Asagartab jî disekine û dibêje navenda wan li Sîstanê bû; lê di dema Asûr de em vana li Medya; di dema Dara de jî em vana li zozanên Arbela yan Asûriyan dibinin. Dara, serokê Asagartaba yî bi navê Çîtrantahma li wî bajarî lidarxist. Di salên 220 û 171 ê BÎ de em eskerên Cyrtîî yen bi pere li Asya Biçûk, di şeren di navbera Roma, Selefkiyan û di nava kraltiyên Bergama de dibinin.(142-,)

Nêrîna min jî ewe ku Kurd gelé herêmê yî eslî, kevnare û ji tu deran nehatin. Di herikandina dîrokê de çûyin û hatin çêbiye, lê ti caran Kurdan demdirêj Kurdistan terk nekirine. Yên demdirêj manî Kurdên niha li Dervayê Welat in. Di sedsalên dawî de ew jî vegeriyane, lê dîsa hatine belav kirin. Dema mirov li Kurdistana îro mêzedike serhejmar bi piranî Kurd in. Kêmnetewê dinê di nav de jî pir kêm in. Ew kêmnetewan, dema êrî§ên mîna yên Moxolan, ji bo ku xwe biparêzin yan jî dema Kurdistan ji alî artê§a wan ve hatiye dagirkirin ew li wir, di nava Kurdan de ma ne. Eger ne wiha biya Kurd ê çima biçin li çiya bi war bibin? Yanî gelé ji derve hatî û xwestî welatekî din dagir bike, ew ê yekemîn li cîhen bi heyî û ji bo jiyanê baş e bi war bibin. Kurd netewa Rojhilata Navîn ê bi kok e û ji şaristaniya dinyayê re gelek îstîfada wî çêbiye. Wekî hinek îddea dikin gelêkî dagirker biya, ew li çiya bi war nedibûn...Eger weqas bi bingeh û esîl nebiya çawa dikaribû li ber ê^ên Ereb, Asûr, Xelkê Golan, Moxol, Tirk, Bîzans û yên din li berxwe bida? Çawa karî li wê herêmê bijî? Eger

mirov li coğrafyayê binêre, miletên Arran bi serhev ve ne; zimanê wan hîna jî cîrane û li ser cografyayeka gişti ye; bi taybetî jî Kurd, gor weqas

asîmîlebûn û bindestiyê hîna jî piştî Ereban miletê herêmê yê duyemîn mezin e... Eğer Kurd wek Faris, Tirk û Ereban bi sedsalan dewlet bûyana û wek Ereban ola wan serdest biya îro nifûsa wan ê bibiya 200 milyon yan jî gelé herêmê yê herî mezin...Ti şık û guman tuneye ku Kurd gelé herêmê ne. Lê ji ber tevgerên siyasî û leçkerivên mezin, beşek ji Kurdan jî cîh guhartine, ew rastiyeke. Bê guman nayê wê watê ku hemû Kurd di wê rewşd dabûn. Ew Kurdên ku cîh guhartinî û ji warên xwe barkirinî hîna jî bi piranî li dervayê sînorên Kurdistan in. Jixwe hesabê yên heliyanî nayê kirin. Emê di vê xebatê de hewl bidin ku vê yekê îspat bikin. Vê dîtine Dr. Frîtz jî piştgiriye lê dike: Di çîrokên Kurdan de tiştek heye; em ji başrır hatin van herêmên çiyayî û zozanên vir. Di eslê xwe de Kurd gelé de§tê ne, bi zora goçên hatinî mecbûrî çiya bûne...(S)

Heta sala 1983 an dihat zanîn, ku şaristaniya mirovahiyê ji Jerîcho (BI 4750) ya li başûre Mezopotamya dest pêkiriye; li Kurdistan û dunyayê hatiye belavkirin. Lê, kolanên li Zagrosan va têza pûç kirin. Zagros: Ciyê de û bavé Kurdan e. Cara yekemin mirovatî li wir, ji şikeftan derket, kete mal û bajaran; dewlet hatin avakirin. Li dunyayê bajarê berî kevn li Zagrosan, yanî li Kurdistanê derketin û şaristaniya mirovahiyê li welatê Kurdan destpêkir. Kolanên li heiêma Xotê Berçêmê ya ku girêdayî navça Amedê Erxanî ye, bajarekî di navbera salên 7250-6750 BÎ hate dîtin. Yanî, ji Çatalhoyuk (BT 6500¬5800) 750 sal; ji Jerîcho 2750 sal kevntir e.(5)

Hatûşa

Ew cîhê kevnareîspat dikinê ku Kurdistan di şaristaniya mirovahiyê de jî yek cihê herî kevn e. Di kolanên nêzîkî Samsat û keviyê çemê Firat, Grîtîlle û Hayaz-hoyukên 40 km li rojhilatî Meletî û li keviyê çemê Firat Caferhoyuk; nêzîkî Elezîzê Boytepe, nêzîkî navça Kovancilar, hoyuka Saraybahçe derkete

hole ku gîştik ji 7000 sal BÎ ma ne. Lê mixabin, çavê dijminatiya netewan reş bibin wa cîhe ku dîroka mirovahiyê û şarîştaniye ronî dikin di bin bendava Kebanê de dimînîn... Prof. Hauptman û hevalên wî di wê heremê de 140 bajarên kevnareyî tespit kirine û piraniya wan jî di bin avê de dimine. Di nav wan bajaran de yên heri kevn Xotê Berçêmê û Nevala Çorî ya nêzîkî Samsatê ye. Ji bo Nevala Çorî Hauptman dibêje "Muhteşem muhteşâm!" Ji ber ku, cara peşi li vî bajarî du cûreyên genim, nîsk, hestiyê miyan, bizinan û berêzan û ibadetxane hatine ditin. Va ji tê wata mirovan li wir çandiniyê kirine û ajelan kedi kirine.. Ji van bajaran jî kevntir, li Kurdistanê bajarekî din ê bi navê Hallan Çemî heye ku 10200 sal BÎ hate ditin, lê hin derbarê wî de tu agahdarî nîn in. Di van bajarên kevnare vên ku li Kurdistanê derketinî holê de hatiye tespîtkirin; ku di navbera bajarên Meletî, Midyat, Amed, Wan û heta Başûre Mezopotamya rê hene. Taybetiyek din daye nîşankirin; ku di giştikan de çand û wekheviya jiyaneka hevbeş heye. A. Eren di pirtûka xwe bi navê 'Doxû Anatolû û Ûrartûlar' de dibêje: Ji destpêka qirna Kalkolitik (sifir-kevir: 6000¬5000 BÎ) de, ji Qefkasya bigre heta Meletî-Elezîz; ji bakûrê Sûrii/ê heta Gola Ûrtniyê, Şehrîzur û herêmeka pir fireh de çandeke hevbeş heye." Va jî vekirî dide xuyakirin ku gelé li vê hereme dijiya, ji kok û binatekî bû û ew jî Kurd in. Va yeka jî pirsa Kurd ji ku hatin? dide bersivandin, ku qasî hişûn mirov digejî Kurd yek ji gelé herêmêyî heri kevn in.

Pişti van dîtinan ev pirsa dikeve hişê mirov, gelo navê vî milêtî wek Kurd derbas dibû an na? Bi qasî tê zanîn navê Kurd tam derbas nabe. Qala welatê Karduk, C/Kirdî û gelek navên din tê kirin lê bi dîtina min ew navana wê demê Kurd bi giştî temsil nedikirin. Dibe ku ew navê hinek êl yan jî federasyon û yek ji zarava axivê Kurda bû. Gelek navên bi vî awayî cüda ye hene. Wek mînak: Arrî-Arran, Xorrî, Gûtî, Kusî, Mad û hvvd.

ARÎ - ARYAN - ARRAN

Beri hertiştî pêwîste mirov li ser peyva Arran raweste. Kesên Kurd bi hêsanî dikarin bibinin ku ew peyveka kurdi ye û ji bo ku navê xwe daye gelêk netewan ew jî îspateka li ser kevnbûna nijada Kurd e. Wek dayikekê yan jî wek kaniyeka ku dena-boyaxa xwe de ye kurahiya dîrokê. Ew jî nîşaneyeke ku kok, çand û şaristaniya netewa Kurd afirandi ye wek zêrekî bin axê ye, her ku tu bikolî ewa derkeve holê. Dîrokzan, gerok û lêkolîneran li ser vê peyvê çi gotine? Em li destpêke li vê yekê binêrin: Aran: Welatê gorîgehê (kurban).(103'93) Arînna: Xwedayê sereke yî Hîtîtan e, wata xwe bi zimanê Lûwî kani ye.(umil3) Wek tê zanîn kani teva nabe û her dem dizê, wata Xwedê jî ewe ku kesê her dem tiştan dide û diafirîne ye... Herodot dibêje Arî tê wata esaletê û bi Arya ve di hema watê de ye.(87) Çima gotiye tê wata asaletê? Ji ber ku ew nijada bi kok û binât bû; gelé herêmê yî kevn bû, xwedî şaristanî bû û gor yên di dûre hatinî bi esalet e, dema nivîskar ew pirtûka nivisî jî rewşa civakî ragihand û bo

vê got esalet e. "Arî" wek min gotî peyveka kurdî ye û ji agir tê. Ku ew jî forma kurdî yê kevn e.

Li ser pey va 'Arı' Şirova heri kevn mumkıine ya bavé dîrokê Herodotos be; ew dema qala gelen rojhilad dike wiha rêz dike: Pars ji xwe re dibêjin "Artae" lê Yewnanî navê Kephen li wan dikin. Yewnaniyan ji Medan re digotin "Arian".'-87 3451 Nav lekirina Yewnaniyan ji bo Parsan balkeş e; ew hêjayê lé ko line ye û bi dîtina min ew Parsan cûda dihesibînê... Lé her wiha nivîskar komeka bi navê Arî jî dide nasîn ku wanan ji Medan cûda nîşan dide. Gor agahiyên di pirtûka wî de: komên li navenda Xorasan-Iran wek Arî tên nişandan/87"343* Ew koma dawî bi dîtina min kalên Kurdên îro li Anatoliya Navîn, Xorasan, rojavayê Kurdistanê û rojavayê Sûriyê ne. Heta mirov dikare li wan Derî-axifan (Xezarî yen li Afganistan jî Deri diaxifin lê ew dervayê ve îddeayê ne) jî zêde bike. Mümkün e xeyalî bê

dîtin lê bi dîtina min di wir de Arîan: Soran-Hewreman-Goran in û Arî jî Kurmanc in; lê pêwîste, ew hîn zêde were lêkolîn kirin. Ji agahiyên Herodotos mirov dikare encameka qetî derxe; ku Kurd (Med) û koma li navenda Xorasanê ye Arî ne. Arî ango Arparêz, bi farisî "Ateş perest" e. Ji mêj ve ola Hînd-Ewrûpayî yan "Arparêzî" bû û pirsên ar û agir du gotinên kurdî ne, tenê di zimanê kurdî de hene.(9"15) Hindîstanî (Pencapî) jî dibêjin "ag". Arya mêriyen berê li Iran û Indian yên ku bi zimanê Arî dengdikirin ew nava li xwe datanîn. Ew mirovên li wir rûdinişti lê bi Arî deng nedikirî re jî digotin Anarya. Izady dibêje: Peyva Arî yê îro di navê etnîkî (el-Ş) Alan de dijî ye. Aryan wek prensip koncepteka zimanî ye ku bi meriyê zimanê Indo-Arian û farisî (Nûrestanî jî di nav de) bi hev re zimanê Indo- Aryanê ji malbata Indo-Ewropî ye ku peşketineka zimanî û çandî ji êlên dinê îndo û ewrûpî pêk tîne.(172‘684)

Iro dema Arî tê gotin neteweyek yan jî nijadek têye fêhm kirin; gelo ew rast e? Iro Alman, Swêdî, Kurd, Faris, Hind neteweyek yan jî nijadek in? Ew îhtîmaleka pir pir hindik e. Lê mirov dikare wiha bêje: Bi hezaran salan berê, li destpêka mirovahiyê, baweriya û ola wan netewan yek bû û zimanê wan jî ji kaniyekê herikî... Çawa îro Islam tê gotin û gelek netewên cûda di nava tixubên îslamê de dijin, Arî jî wiha bû... Peyva Arî bi xwe ji agir tê. Kurdên Anatoliya Navîn hîna jî nabêjin agir; dibêjin "ar/êr". Ew zimanê kevn e. Gor zimanzanan, di taybetmendiyê zimanê Kurdên Anatoliya Navîn de motîfên kurdî yê kevne 4000-5000 sal berê hene. Jİ bo vê Arî ya ku îro tê ziman, ji coğrafya ku gelên bi ar/agir bawer dikirî tê. Yanê Aran erdnîgariya miletên bi agirbawer dikiriye û di navenda vê de jî Kurd hene. Gelek nijad ji wê cografyê li dinyayê bilav bûn. Di beşa serhejmarê de min qal kiribû. Li welatekî û li gelek cîhan wî agirê pîroz herdem vêdikeve -wek ocaxê herêmî yê di Elewîtiyê de- xere (eger), ewê wek welate Arran-Agiran bê binav kirin. Eger neferek ji wê cografyayê

biçûya cîhekî din pêwîst bû bigota "Ezî ji welatê Arran im". Navenda wir jî Kurdistan û Ezerbeycana îroyîn e. Xelkê ji wir çûyî Ewrûpa, Hindistan û cîhên din jî gotine em Arî ne. Ku ew peyva yê ji kût/kin kirina

Arran derketî yê. Gelek dîrokzan didin xuyakirin ku li Kurdistanê berê cîhê agirgehê hebûne. Hîna jî li Iranê ew hene. Li cîhekî ku ar weqas pîroz be, navê Arî, aran, aryan jî weqas nemir dibe.

Bilgin îddeayeka pir balkeş dinivîse: Gor lêkolînên dawî Aryanan Volgayê ji xwe re 6000 sal meskên-war girtine. Van a hesp li wir kedî kirine û ji wir li dunyayê belav bûne.(7190) Bê guman ew îddeayeka pir cîdî ye, bersiva wê karê dîrokzanan e. Lê beşek Kurd di bin navê Saka de ji wê herêmê heta dora Gola Aral demeka dirêj jiyane. Dîsa Bîlgîn dinivîse ku: Sirî derya-Amu derya welatê Arya yî orîjînal tê qebûl kirin, Sasaniyan vê re Îranîvej digotin.'719l) Li ser wê dîtine di nava zanyarên dîrokî de îttîfaqek nîne. Hinek dibêjin Kurd ji rojhilat hatine; yên din jî dibêjin Kurd gelé Zagrosane. Bi dîtina mîn jî Kurd gelé Kurdistana îro, Anatoliya, Derya Kesk û Heyva bi Bereket in; beşek ji vir çûn navenda Xorasan û Amû Derya û piştre dîsa vegerîn...Hema nivîskar di berdewamî yê de dibêje: Ji vir beşek çû Hindistan şûnde, 1800 sal BI Saravatî li herêma Iranê çiyayî bi cîh bûn û beşek ji wan jî Mîtanî bûn berbi başûrû rojava çûn. Sala 800 BI jî Medan bi Parsan cîhê xwe terk kirin.(71'92) Bi dîtina min ew îddea ji bo beşa Hatî-Hîtîtan rast e, lewra di heman demê de (1800) ew koma tê Anatole. Medan jî xwe li hember Asûr li bakûr bi rêxistin kirin, yekîtiya xwe çêkirin û hêdî hêdî vegerîn cîhê xwe û navenda dijminê xwe. Mirov dikare vê tevgerê wek vegerekê binirxîne, ne wek cîhê xwe terk kirin. Dîsa jî hêjayî lêkolînê ye...

Wek tê zanîn navê Afganîstanê yê berê, yanê heta salên 300 PI jî Aryana bû, paşê bû Xorasan û ji sala 1800 an de bû Afganistan. Dîsa navê Iran jî ji vê peyvê tê. Xorasana Iranê yê wê demê di nava sînorên Aryana de bû.

Bi hezaran sal BI li Kurdistanê û bakûrê tixubên Kurdistana îro ku Ezerbeycan jî di navê de, navenda gelên agirperest bû. Vê yekê bandora xwe li Rojhilata Navîn jî kiriye û di gelek niqtan de kultureka olî ya hevbeş derketiye holê. Xelkê Misrî yî bi rojê bawer dikiriye û navê pêxemberê wan yek jî ra/ro ye. Di vir de îddea ya Collins tê piştrastkirin.<159) Di nava beşekî Kurdan ewê bûne Arîna ku raste rast peyveka kurdî û ji forma agirê kevn ar tê ye. Di nava Asûriyan û Hîndiyan de jî bawerî bi vî awî ye. Li wê coğrafya fireh tenê bawerî bi roj û agir tê ku ba^ş e. Bandora wî olî bi hezaran sal dom kiriye û heta sedsala XX an jî bi awayê "ocaxa" (ateşgeda-Altar) hîna jî di nava Kurdan de jiyaye. Hîna jî Kurdên li dervayê welat dema sond dixwin, dibêjin: "Bi vê rojê be!" Li rûpelên pêş emê dîsa li ser vê rawestin.

Birêz Ethem Xemgîn dibêje: Ji gelé û ji zimanê wan re jî gotine "Arî". Ji ber vê yekê gelek nivîskar îddea dikin ku Ariyên rastî gelé Kurd ê.(53) Ew yeka ji alî kevirên BI 843 an de ji Asûriyan mayînî de hatiye îspatkirin. Di wan de dinivîsîne ku ji gelé dora Kirmanşah re digotine Aryan. Xêr ji vê, peyvên kurdî yê hatinî dayîn ser vê komê, navê Xwedêyan, di alî olî de pîrozbûyîn, navê li ser gelek cîhên cografîk ên mîna Arîobarzanes (Arî-berzan, Ezerbeycan), Armeniyan, Ardahan (Ar-dadan), Ararat (Ar-hat), Aras, Iran û hwd û

bandora he ta roja îro berdewam bûyî hinek îspatên ji vê ne. Siraç Bilgin di- bêje: Ihtîmaleka mezin e ku berî ji hev veqetandina yekemin, ji bo Kur¬dan ev peyva "Aryan" bi kar dihat. Keltiyan ji bo wan mirovan digotin "Ariovistus". Ji bo qewmên bakûr û navenda Ewrûpa û evên girêdayî wan ên ku koçî Hînt-Iran kiri giştikan re digotin Aryan. Aryanan heta he- zar sal Bi di nav yekîtiyeka ziman û çand de bûn.(71) Heman iddea ji alî Şerefxan Cizirî ve jî tê kirin ku geiên li Anatol û Mezopotamya li ser esasê ziman dike sê beşan:

A- Gelen kevnare (nişteciîh): Ne Hînt-Avrupî, ne jî di koma zimanê Samî de ne. Di Mezopotamya de şaristaniya herî peşketî Sumeran ava kir. 5000 sal BI evvna ji Zagrosan koçî başûre Mezopotamya kirin. Berî ew werin jî gelé din li wir hebûn. Li bakûrê Mezopotamya jî gelé kevnare Xorrî hebûn. Asûriyan vê re digotin Subartu.

B- Geiên Hînt-Ewrûpa: Welatê wan başûre Rûsya bu; di navbera Derya Reş û Xezaiê de belav bûbûn. Ji ber pirbûna serhejmarê û kembûna erdên çêre koç kirin. Di nava wan de yekîtiya zi manî he ye, lê ne eynî neteweyek in. Ji wan re Aryan digotin û hinekan koçî rojavayê Ewrûpa kirin. Even koçî Anatol, Asya û Mezopotamya yê kirinî re jî gotin Hînt-Iranî. Vana, Hîtît, Mîtanî, Med, Pers û Keltî bûn. Van koçana di navbera BÎ salên 2500-2000 dom kir. Med li dora Urmiyê û Wanê û li başûre Xezarê koçber bûn.

C- Geiên Samî: Akad, Asûr, Amori û Aramî ne. Welatê xwe çola Erebîstanê û Sûriye ne.

Di roja îro de koma Arran bi nave Iranî tê xwendin. Di vir de Iranî ne tenê di wata Fars an de ye. Ji ber ku di vê komê de Faris xwedî dewleteke bi berdewamî ne ew nava yî girtî ye. Lê, ew nav Arranî yan jî Kurdî biya hîn baştir û hîn di cîh de dibû. Lewra Faris tenê êlêk yan jî konfederasyoneka ji vê komê bûn. Yekê jî bi qasî mirov dibîne li bakûrê welatê me navê ji Arran a manî zêdetirin. Mirov dibêje gelo ew (Ezerbeycan) navenda wan bû yan jî herî dawî li wir bi hêz bûn? Wekî tê zanîn gelé herêmê Gurcî jî derengî ji ola Zerdeştî derketibûn. Ew jî cîhê lêkolînê kûr e. Li ser jihev belavbûna vê kome jî S. Bilgîn dibêje: 2000 sal BI komên Hînd û Iranî ji hev veqetîn. Civata Hînt geliyê Hayber derbas bûn û çûn Hindîstana îro. Bav û kalên Iranî yen îro li demeka din li Asya Navîn man.(71) Ev veqetandina 2000 salan BT mümkün e

ku di navbera komên Belûc, Piştû, Darı, Saka û yen nêzîkî wan de pêk hatibe. Iddea ku Arranî li Asya man û ji stebên Asya berbi başûr belav bûn

niqteyeka girîng e. Gelo hemû Arranî li ba hevbûn yan jî ew komek ji Arranî bûn? Rêwîste ew baş bê lêkolîn kirin..

Dîtinen dijber jî îddea dikin: ku Kurd ji başûr berbi bakûr belav bûn. Birêz Mihotûlî dibêje: Aryayî ji navenda Zagrosan berbi Himalaya û rojava belavbûn; ew yeka ji ziman, ol û fîzîka wan tê fehm kirin û ji kolanên arkolojîk jî ew hatiye îspatkirin.(S7-45) Bi dîtina min di tespîtên bi vî rengî de dem roleka bingehîndilîze, nizanim mebesta nivîskarkîjan dem e. Lewra Kurdan dembûye çûne, dem bûye vegerîne. Netewên Arya li destpêka dîrokê li tevahî Anatolê, rojhilatê Derya Spî, başûıû Qefqasan-Ezerbeycan, A/E-rbûnî (Ardahan), rojavavê Iran û Derya Kesk, Xelîça Basra rûdiniştin. Bi erîşûn ji rojava, başûr û bakûr re helkiştin çiyayên wê coğrafya yê. Ew çiyana welatê Aryan e û navê nijada wan jî Arî ye. Iro jî xelk, di nava wê cografyayê de gelêk cîhan wek "ARAN" bi nav dike.(87) Hinek dîtin hene ku li Ermenistan û Ezerbeycana îro tu caran Kurd nebûne xwedî desthilatdar û nebiye welatê Kurdan, piraniya wan jî ji alî nijatperestan ve tê gotin û bi vî awî ew dixwazine mêjiyê gelé bişon. Lê tenê peyva herdu navan jîkurdî ye. Armenien û Arîberz... Ar-ji agirê kurdî; berz jî ji bilindi ku di wata: mêrên ji Aran û agirê berz de ye. Kurd nişteclhên wê herêmê yê herî kevn in. Gurcî yê wir jî berê Agirperest bûn; piştre derbasî Xiristiyanî yê bûn; ku ew jî nîşaneyeka kevnbûna Kurdan yê li mintikê ye. Bi cîhbûna Kurdan ya li navenda Ermenistan gelek kevn e. Ermen bi xwe di salên 700 BI de hatin. Lê berî wan Kurd li herêmê dijîn û di dema Medan de jî dengê Ermenan tunebû. Di dema Farisan de jî hêzên Kurd û Faris li herêmê hebûn. Di serdema Islamê de jî Kurd hebûn. Ji sedsala V an PI heta sedsala XI an koçberiya Kurdan ya Ermenîstanê berdewam kir.(X54 193) Ew dema jî rastî ber hatina Tirk û Moxolan tê, Arran hertim bû ware Kurdan. Tenê mirov li navên herêmê (Derbend, Aras, Kur, Rêvan, Anî...) binêre ew têr dike ku herêm welatê kê bûve..

J

Gelek îspat û işaret hene ku herêma Qefqasan, Kurdistan, Derya Kesk, Iran, Xorasan û Asya Navîn welatê Arranê biye. Li ser vê niqtê Izady dibêje: Gel en li bakûrê Rojhilata Navîn, Asya Navîn hema hema bi tevahî, nêzîkî 500 sal BI wek zimanê zikmakî Hînt-Ewrûpî bûn; koçberên li Kurdistan, Iran, Asya Navîn û Hindîstanê bicîh bûnî, xwe wek Er yan jî Arî (Aryen) binav dikirin.054' iso; Seferoglû jî dibêje: Coğrafya Aranê di navbera çeme Kûr û Aras de ye û bi herêma Tiflîs, Rewan, Gêncê û Qerebaxê re tê gotin. Di belgeyên Qirna Navîn de jî wek Aran derbas dibe. Sala 700 BI li wir Sakasen/Sakasûn dijîn. Şaxekî kî wana yî bi navê "Saka Bala" di navbera 646-1576 an PI de bi navê Kurd dihate nasîn. Ji êla Babirakan "Kolû Uzûnoglû-Mil Dirêjan" Kurdên Xiristiyan bûn, berî sala 1050 Gregoryan, paşû jî bûn Ortodoks. Mîrîtiya wan li Anî yê 1200-1317 de jiyaye.(9M5) Li wir du-sê niqteyên girîng in derdikeve holê, yekemîn; gelo hinek ji êla Dirêjan bûn Xiristiyan? Ya din: tenê ji wê herêmê re

digotin Aran? Sêyemîn jî: Saka yê li wir dijîne. Saka Iskît yekin? Li wir jiyana wan rastî berî Med an dike, ew jî têza ku Kurd ji ber erîşen dijminan reviyan herêmên çiyayî bi hêztir dike. Ji bo ku derbasbûna alî Qefqasan bi zahmet e û pêwîstiya geliyê Arran derdixe holê, ew yeka îşareteke ku beşek ji Kurdan li bakûrê Derya Reş dijîn û hinekan ji wan jî ew alî Qefqasan girtibûn. Bi qasî min lêkolîn kirî, têkiliya Kurdên îro li Anatol û Xorasan û mintiqeyên din bi wan Kürdana re heye. Van dîtinen min Seferoglû jî piştrast dike ku balkeş in: Wekî te zanîn Kurdên Kûr-Arasê ye ji zend a Rewadî yan jî Şadiyan wek sê beran li Anî, Divîn û Gêncê di navbera salên 950-1200 an de mîrîtî damezirandine. Vana ji bo fetîhkirina Anatole ji Selçûqiyan re rêbertî û kilavûzî kirine ku torinê Saka ne.(9I Ib) Kîlîta girîng ê dîrokê li vir destpêdike: Eger ew dîtina rast be, em rê li rûpelêkî nû vedikin û dibêjin ku Kurdên îro li Anatol, Xorasan, Rojavayê

Kurdistan û Sûriyê neviyên Sakane û ew Saka yên ku mohra xwe li dîrokê xistî kal û bavé me ne!

Kesê li ser Arrî-Arrana şiroveka cûda tîne birêz Abdullah Ocalan e, Ocalan wiha dibêje: Dîtinen dibêjin; çav şîn, por zer ên Arî 2000 sal BI ji Ewrupa çûne stebên Rûsya; ji wir jî li Iran, Hindistan û Anatolê belav bûn ji kok de şaş e. Ev îddeaka nijadperestî ye. A rast ber eqsê wê ye ku ji Hîlala bi bereket ew belav bûn.(72) Çawa min li jor jî nivisî di vê de tu guman nîne. Bi taybetî jî; bi pêşketina împeryalîzma Asûr û Ereb an, ew gelên wê herêmê berbi çiyan û mintikên bê însan belav bûn. Tespîteka birêz Ocalan a dine girîng jî ev e: Di her peyveka Rojhilata Navîn de Sumerî roleka girîng lîstiye. Di wir de jî wiha ye. "Ar" û "Ard" di Sumerî de tê wata gîsin (saban) û erdê ku teyî ajotinê. Sumeriyan bi erdê ku bûyî şûv re digotin "ard". Mümkün e ku wan jî ew peyva ji gelé herêmê yê cotkarî dikirî û bi navê Xorriyan girtibin. Yanê Aryen tê wata: Xelkê ku erdê dajoyî. Peyva Aryen, nijad yan jî ji temsila etnikekê zedetir, komên ku cotkarî û malcitî bi pêşda birinî re dihate gotin.<72) Ji bo ku kesên kurdî nizanin peyvên Sumerî werdigerînin zimanê din -bi taybetî jî tirkî- şaş werdigerînîn. Bi dîtina min îhtîmaleka mezin e, ku ew "erd" e, yanê bi cîhe kirinî şûv re digotin erd. Di kurdî de hîn jî ew peyva bi kar tê. Ew di wata erdê ajotî û najotî de jî bi kar tê. Lê di peyva Ar de ti guman tune ku agir e. Bi dîtina min, peyva Arrî-Arran-Arryan a ji hertiştekî bêtir girêdana xwe bi bawerî û dîn re heye.

ARYEN - SAKA

Wekî min li jor jî got, li ser axa welatê me gelek cîh hene ku bi Ar-Arran (Ezerbeycan, Aras, Ardahan, Arpaçay, Anî, A/Erîvan û hwd) hatine navkirin. Yek ji wana jî çiyayê Agirî ye. Agirî yan jî Ararat, peyvên kurdî ne. Ar- di Kurdî de agir e; -arat jî îhtimaleke mezine ku ji lêkera "hatin " ê zivirîbe vê forma îro. Yanê di wata agir jê hat de ye! Tenê ew peyva jî dide

xuyakirin ku Kurd ji dema ew çiya volkanik biye virde li wir bûne û ew navê ar-agir li wî çiyayî dane. Nêzîkbûna wî û Aran jî balkêş e.

Gelek lêkolîner, dîrokzan, antropolog, filolog dema qala dîrokê dikin, gilî gazincan dikin ku navê Kurdan di belgeyên dîrokî de kêm derbas dibin. Raste. Sedemên wê hene bê guman. Di serî de, Kurdan li destpêka mirovahiyê li ser hey va bi bereket şaristaniyeka gelek peşketî afirandin. Bi alîkariya avûhewayê û rûbaran jî vejîneka mezin derket holê. Ve heyî yê, li wê wextê nav û dengê xwe gelek belav bû û ji mirovan re bû navendeke kombûnê yan jî erîşe. îro çawa mirov xwe li Ewrûpa û Amerika digirine û dixwazin li wir bijîn, wek wê bû. Ji ber pirbûn û bi hêzbûna Kurdan yê wê demê, ku bi sîstema élan de dijiyan pêdiviya yekîtiyeke netewî nedîtin. Elek yan jî federasyon û konfederasyoneka ji êlên Kurd têra parastina wan dikirin. Li hember vê, dijminan xwe hîn zêde bi rêxistin û hêztir kirin ku hêza Kurda ye têra wê nekir û belav bûn. Ew êrîşên dijmin jî Kurd mecbûrî yekîtiya netewî kirin ku vê jî împaratorî ya Medan derxist holê. Ji bo wê, Kurdan li destpêka dîrokê navên êla, federasyona élan, malbatan û şexsan bikar dianîn. Wek Gûtî, Xorî, Mîtanî, Hatî, Lûlû, Kasî, Lûwî, Mar, Elam û hwd.

Sembolên ku Arrana bi kar tanî jî gelek watedar in ku mirov bandora wan li hemû heiêmê dibîne. Mihotûlî dibêje: Di hunera Ariyan de sembolên herî girîng: roj, boxê/canege û xezal bûn. Boxé sembola Xweda va bahozê bû, xezal jî sembola Xweda yê parastinê ya pîroz bû. lêrikên (kurs) rojê jî sembola çanda agir bûn.<87‘105) Bandora rojê jî li Asya û Rojhilata Navîn tê zanîn, boxé jî li Anatol, Misir û Hindîstanê gelek hêja tê dîtin ku sembola çanda hevbeş e...

Navê Kurdan

Li jor jî hate gotin ku êl, federasyon-êl û konfederasyonên Kurd gelek navên cüda bi kar anîne. Ji bo ku her federasyon jî gelek bi hêz bûye, pêdiviya yekîtî û netewbûne nedîne. Yan jî rêberekî bi hêz derketibiya, hemû êl û federasyon di bin navekî de kom kiribiya encam cüda dibû. Ew yeka ji alî gelek nûseran ve, cüda hatiye şirovekirin: Firat dibêje: 1300 sal BI gelé bi navê Haltî-Lohorto li "Orarto" rûdinişt. Wana berê bi navê "Gotto" yanê şârvan dihatin nasîn. Ew nava ji alî Asûriyan ve wek Gerdo dihate xwendin û peyva Kurdo jî ji wê derket. Xort îro wek kehreman tê zanîn, Kurd hîna jî wextê bangî hev dikin dibêjin lo xorto.(127_9) Bi ve sîstemê mirov dikare bibêje ku navê Gûtî jî nêzîkî wan e.

Navê Kurd ji ku hatiye, cara yekemîn kingê bi kar hatiye û wata xwe çi ye? Birêz Ocalan dibêje: "Baş tê zanîn; ku cara ewil navdayin ji alî Sumeran ve bûye kevneşopiyek. Ihtimaleka mezin e ku peyva Kurd ji Sumeran tê. "Kur" di zimanê Sumerî de tê wata çiya. Ev ek a din jî "ji kuderê" îfade dike. Bi vê re girêdayî ev tê wata "gelé çiyan". Di Sumerî de "Kurtî" gelé li çiyan dijî ye. Vaya di dawiyê de Grekan ji Lûwiyan heynan û wek "Kurdienne (Welatê Kurdan) bi kar hat.(75) Tê wê watê ku Kurd, di dema Sumeriyan de li çiya bûn? Vê yekê jî em ji jêderên Misir fêr bibin:

Gor belgeyên Misiriyan 3.000-2.800 sal BÎ gelé li rojhilatê Misir (Kurd) wusa resim kirine." Enîpan, poz têyr, wek çûka hov hatiye teswîr kirin û kralê wan jî navê xwe Anubaninî ye " Di belgeyên Sumeriyan de jî wiha ye: " Eni pan, poz têyr, şervane çewîk û wek çûkê hov in. Ew desthilatdarên çiyayên rojhilat in û kralê wan jî Anubaninî ye" hatiye çêkirin û resimkirin. Di belgeka din ê Sumeriyan de ji bo Gûtiyan (Kurd): "Şeytanin çiya û dijminên Xweda." tê nivîsandin. Bi tesfîra Misiriyan ve hevdû digre û tê nivîsîn ku: "Xelkê enî pan, poz qertel, çewîk, şervan û mina çûkê hov in" Di destana Gilgaır^ş de tê gotin, ku ji Tûfana Nûh şunde

gelé cara yekemîn bûyî xwediyê Mezopotamya wanê çiyayî ne.(4) Anu-banînî di esas de kralê Lûlûyan e û bi Gûtiyan ve bûn yek û dewlet ava kirin.

Xenophonê Grekî wek rojnamevanekî beşdarî sefera Grekan ya rojhilat bûbû. Fermandarê artê§ê dimire û ew serokatiya leşkeran digre ser xwe. Di Kurdistanê re derbasî Ermenistan; Derya Reş û dîsa vedigere Grekland. Di pirtûka xwe ya bi navûdenga bi navê "Vegera Dehhezaran-Anîbasîs" ku di salen 401-400 an BI nivîsandî de, ji bo Kurdistanê dibêje Karduchoî (Kardaka).. Gorî wî, ew welatê yî li rojhilatê Kentrites (Botan) ê bû. Dibêje, wexta artâşa me gihîşt navça Zaxoyê em rasta gelekî aza û şervan hatin, navê wan Kartuxî bû. Ev gelé han di navçekê çiyayî de dijiya û daxwazek wan a cîhêbûnê ji Şah hebû û ji jiyana serxwebûnî û azadiyê hez dikirin.(16) Di seferê wî yê ku di Kurdistanê re derbas bûyî de hertim qala vî gelî dike. Ev gela yî qet benda wî bernade, rihetiyê nade eskerên wî û naxwazin ma ew welatê wan dagir bikin; ev gelé Kurd e. Gorî ew dinivîsîne, wê demê vî gelî ne desthilatdariya kral Artaxerxes, ne jî desthilatdariya Ermeniyan nasnedikiriye. Her çiqas hinek kes dibêjin ev gelé Gurcî bûn jî ne tiştekî raste. Wek tê zanîn Ermenî ji bo vê herêmê dibejin Kordûdh, Aramî dibêjin Beth-Kardu, Ereb jî dibejin Bakarda (Kardaî). Di Akadî û Asûrî de kardu tê wata qehreman, karadu jî te wata bi qûwet.

Li ser navê herêmê Minorskî dibêje: berî Selçûqiyan peyva Kurdistan nedihate zanîn, ji bo wê Ereban agahiyên li ser Kurda ye bi navên cûda cûda dane. Wek: Zavazan, Hilat, Armeniye, Ezerbeycan, Cibal, Fars û wekî din. Agahî ya cara yekemîn Mesûdî û Îstahrî 951 an de didin. Dîsa gorê wan Kurd li Xorasan jî hene.(5I) Ew tespîteke raste, ku heta niha ji alî lêkolîneran ve nehatiye dîtin.

Şahnama ku sala 1010 an de ji alî Fîrdewsî ve hatî nivîsîn de jî tê gotin ku: Ji milên Dehak yek mar peyda bûn; ji bo wana rojê du xort dihatin kuştin û mêjiyê wana didan maran. Pa§ê şûna xortekî pezek kuştin û xortê rizgar bûyî re jî gotin herê çiya û qewmê Kurd ji wan peyda bû ku bajar nedîne.. Malên wan kon in û tirsa Xwedê di dilê wan de qet tune ye...m Bê guman ne bi vî awayî biye; gor çîrokê ew kralê ku Kurdistan dagir kirî, wekî kesekî di lasê wî de mar derketî, bi hov, bi tirs û bê vijdan tê nîşan dayîn. Kurd jî ji ber wî çûn çiya. Ew dagirkirina Kurdistanê û çûyîna Kurdan yê serê çiya bi vî awî sembolîzê dike.

Tofana Nûh

Di cîh guhartina miletan de tofanê xwezayî yen mîna: erdhej, serma, nexweşiyûn mîna tîfo, teqîna volkanan, hişkbûn û lehiyê jî roleka mezin lîstine. Yek ji wan tofana girîng jî ya Nûh e. Avûhewa serûbin bû; ji ber wê jî welatê Kharsag/Xarsagbi tevahîji holêrabû. Kesênkubajar dewletên li Mezopotamya li derdorê 5500 BI de hatinî avakirinî ji cîhên xwe rabûn û çûn.(l59'256) Bajarên kevne ku piştî deh hezar sal BI li hîva bi heyî hatinî çêkirin bi vê tofanê re bin ax bûn û gelé barkirin, îhtîmaleka mezine ku çûbin çiyayan. Hîna jî di bin axa welatê me de dîrokêka eşkere nebûye, ramedî ye û li bende derketinê ye.

Di kevalên kilsê yên li welatê me Kurdan derketine de qala nexweşiya giran wiha tê kirin: " Kûzên genimê tijî bûn, îsal mahsulî/heyî ye baş bû. Mar- jin bezî mabêda pîroz. Li mal mêrê wê-Xwedê Enlîl-ji nexweşiyû bê hal ketibû. Mala xanim Nînlîl, hêlîna wê, ew mala dibiriqî ji nexweşiye dişka. Nexweşî... nexweşî -li her welatî belav bû. Dayika min a muhteşem! Wî ji nexweşiy§ biparêze. Ji wî marî re êdî rihetî nîne, ji nexweşî û êlêf/agir."

Dayik ji bo ku zarok baş bibin gelek dûayan dike, di dawî de zarok rind dibin. Lê ji bo ku careka din ew nexweşî dubare nebe, tedbîr werdigire:

"Xwarina ku tu li Eden ê (Cennet) çêdikî rind bikelîne, xwarin gerek baş bê paqij kirin. Bavo, goşt xwarin dijminatiya herî mezin e".(l59253)

Dihemanbelgeyandeqala kavilbûna welatê Xarsagjîtê kirin: Sermayeke pir xirab welat girt; bahozê her der reş kir. Xelkên mala Xwedê Enlîl êdî şa nabin. Qedeiê ser malê girt. Ji berfê mala Enlîl êdî xuya nake. Ji hêrsa sermayê çar dîwarên Xwedê em parastin. Qedera Embarê deyndarê dîwarên qaling e,

ji ava bi bahoz û hêza wê em xelas bûn. Lê, nikarî manga ji holê rake

Welatê

min belav bû; lê ji holê rakir -tenê av e- çi heyfe ku hertiştek ji holê rabû..,<l59‘256) Vekirî dide xuyakirin ku xelk ji welatê xwe çû û hertişt ji holê rabû. Bê guman xuya dike ku gelé ji wir çûyî di alî çandinî û xwedîkirina ajelan de xwedî zanyarî bûn.

Di lêkolînên li herêma Sumeran de hatî kirin de derket holê, ku dema tofan bûye (4500 sal BI) xelk nişstecîh bûye û di qirna sifir (mis) de dijiyaye. Tofanê bi dirêjî 500 km û firehî 150 km re erdî di bin avê de hiştiye û di navbera Zagrosan û heta de§tên Sûriye yê bilind belav bûye. Ew karasata, di destana Gilgamûş û heşt kralên berî wî jiyanî de jî te qal kirin. Dîsa tê nivîsîn ku piştî tofanê gelé ji bakûr ve hatî li wir dibe desthilatdar. Ew gelé hatî di alî cotkarî, ajeldarî, maden de gelek pöşketî bû.(4) Ew gelé hatî Sumerî ne. Gelek nivîskar û lêkolîner dibêjin ku Sumerî ji bakûr ve hatine.

Gereg gelé Arya yî ji Asya pêşîn çûyî ew bûyera Nûh li Hîmalaya kat/ qal kiribe, lewra mirov nikarezanistîîzah bike ew kultura di cografyeka weqas fireh de çawa dişibine hevdû. Belgeya li ser wê bûyerê 3000 sal BI ye û di wir de tê gotin; ku Utnapîştîmâ ji bavé xwe tofanê bihîst û keştiyeke mezin ava kir. Bûyer 4000 sal BI li bakûrê Mezopotamya pêk tê, bi erdhejeka mezin re

gola avê hildivveşe û av berbi başûr diherike. Keştî li ber avê dikeve û li çiyayê Nisir disekine.(87'45) Bi ditina min ew jî îspatek e ku Kurd ji Anatol û ji hîva bi bereket ber bi bakûrê Derya Reş, Xorasan û Asya çûn. Di beşa Macar û Kurdan de jî emê bibinin ku hinek Kurd li Asya Navîn in û li ser keviran çîroka xwe nivîsandine.

Şaîre welatê Kurden Kassiyan, Sîn Lekke Unîn ê ji Riha, di destana Gilgamê§ de wiha dinivîsîne:

" Şert'kî mîrovatî ji erde rakira Şûna tofan bişkerıe derbas bive,

Bajarék ji hole rabûı/a Şûna tofan bişkene derbas bive,

Veba dinya dişeıvtinî hebûya Şûna tofanê

Birçibûna dunyayê diqewrînî hebûya Şûna tofanê...

Navê Xarsag jî balkeş e. Gor birêz Collin nîşan dike welatê Kurdan e. Lê çima gotine Xarsag? Gelo ji welatê Xorriyan re digotin? Ihtîmaleke mezin e. Ji alî din ve ew nava dişibîne navê Xorasan jî... Gelo Kurdên ji welatê Xarsag piştî tofanê yan jî ji ber êrî§ên dijminan çûn bakûrê rojhilat û li wir welatê avakirî ji welatê jê hatî bi navkirin? Ne dûr e, lewra îro jî li Erzirûmê navça Xorasanê heye, her wiha li Iranê jî; heman kesan nav dane herdûyan. Dîsa navê Şîrvan jî bi heman awayê ye. Lê vê yekê jî em ji dîrokzanan re bihêlin. Ji bo destpêka wê em berê I i ser Xorriyan ra westin.

XORRÎ

Hemû jêder, lêkolîner û nûser vî navî wek Horî dinivîsînin lê bi min ew tam ne di cîh de ye; lewra koka wê peyvê ji Xor a kurdî tê û gereg rastnivîsa wê jî Xorrî yan jî Xorî be. Wekî me li jor qala welatê Xarsag kirî de jî me got girêdana wê bi Xorriyan re heye. Di nivîsên bi mixî de Xorrî wek "Kharrî"- Xarrî hatine nivîsîn. Li ser kevirên Bisutun de peyva Arran û Harrî di heman wateyê de hatiye nivîsîn.'87116) Ew yeka jî pir watedar e

ku wata Arran û Xarrî wek heve, yek e. Yanî Xarrî ye Arî ne, yan jî ew ji welatê Aran in û hevûdû temam dikine. Di kurdî de "Xor" di wata rojê de ye(19); di farisî de jî ji rojê re

dibêjin Xorşît; di wir de têkiliya peyvan, coğrafya û ol hm balköş û vekirî xuya dibe... Peyva Xorrî jî balköş e. Xor-me got ku roj e, -rî jî di kok de rê ye; rî be jî ne şaş e, ji ber ku hîna jî Kurd rî bi kartînin û tê wata: Riya rojê, ji bo ku roj di nav wê komê de û li ser wê erdnîgariyê pîroz e, wata, gelé li ser riya Xwedê derdikeve holê...Li peş dîsa gelek peyvên mîna H/Xorasan, H/Xarran, H/ Xaleb, Aras, Alan, Xweza, Xwedê û hwd ên bi wî rengî emê li ser bisekinin.

Lêkolînerên Ingîlîz navê Xorrî wek Human û Hurrîte; Babîliyan jî wek Horîte bi kar anîne, ku ew jî digehejê navê Xorriya yî ji bo xwe bi kar tanînî. Kralê Mîtanî Tûşattra, nama ku ji kralê Misrê re şandî de: Hur-wu-(u)- he (Hur-ru-he) dinivîsîne. Ji alî Hîtîtan ve jî wek Hur-la bi kar hatiye. Li bajarê Nuzî (Kerkük) wek Hur-ru- (m)-î û li belgeyên Hana de jî wek Hu-rî bikar hatiye. Bi Sumerî cîhê ku Xorrî lê rûdinên re Subir dihate gotin. Ji bo Xorriyên Aryan digotin "Eve ji welatê bilind". Ji bo Babîlan ew welatê bakûr bû û ji bo Asûran jî welatê xerîb bû. Ji bo vê 2000 sal BI Subarî bi Xorriyan ve jî wek hev dihatine qebûl kirin.(94 142) Mînak: Nînua-rî, Arrafa-rî, Hana-rî tê wata: Kesê ji Nînova, ji Arrafa... Hu: saha; Hî: rê, He: pirê...*94'157' Ji wan agahiyan mirov dikare Hu di wata saha de yê; wek saha rojê, mala rojê, cîhê rojê bibîne. Rî jê di wata "ji-hatin" de ye. Yanî "ji welatê rojê ye"; bi dîtina min ya herî rast ew e, ku kesên di riya rojê de ne. Di zimanê Sumerî de ji Xorriyan re digotin Khurrî-Kurrî; di belgeyên Misiriyan de jî wek Kharru; di Tewratê de jî wek Hor yan jî Horît derbas dibe. Di zimanê Babîlî de tê wata şikeftan û bajarê Xorrî jî li cîhe Riha yê îro bû.*137'50' Ş. Beysan dibêje: Bi zimanê Sumerî, Xorrî tê wata Welatê Bilind. Welatê wan li bakûr û navenda Mezopotamya de bû. Ji bo ku

Sumeriyan li başûrû Mezopotamya dest bi jiyaneka nû, nivîsê û şarîştaniye kirin ku ew coğrafya jî deşt e; çiyayên Kurdistanê ji wan re 'bilind' xuyadikir ku ew jî xwezayî ye. Wata şikeftan jî ne şaş e, mümkün e ku ew netewên cîran Xorrî bi şikle jiyana wan jî ew bi navkiribin ku şikeftûn li bakûrê Kurdistanê îspata wê ne. Yekê jî şikeft wê demê gereg di asta bilind de bin yanê lûks bin, lewra gor şertön wê demê ew wek qesra ne.

Li Anatoliya Navîn û Xorasanê peyva "Xor" a ku îhtîmaleke ji koka Xor têyî ye, di hinek rewşan de di wata zeîf-jar bûnê de, di hinek rewşan de jî di wata melodî ya di xew de tê bikar anîn. Dîsa li Anatoliya Navîn peyva koka xwe îhtîmaleke ku ji Xorrî digrî ya "Hûr": di wata kesê gotinan fêm nakî-lûrt, azad û serbixwe de bi kar tê. Wextê li yekî hinekî bi hêrs ketin dibêjin "Va çi Hûr re! Yan jî çî lûrt e!" yanê gotina gelé din nabihîze. Lê di vir de pirs ew e, ku ew peyva ji Xorriyan de ma ye an ji "Hürriyet" a erebî-tirkî hatiye stendin ew ne diyar e. Ne dûre ku koka Hurriyetê ji Xorriyan hatibe.

Di Incîlê de Xorrî wek gelé di şikeftan de bikar hatiye û hatiye nîşandan. Xorrî ji cîhê ku şike^n xwe gelek hatiye.<94"209) Paytextê Xoriyan jî bajarê Orrhos (Riha) bû.(94‘33) Orrhosê mirov nikare wek Arhosê, yanê bi agir re eleqadar bixwîne? Xuyaye ku peyv bi latînî hatiye gotin, Orr-ji agirê kurdî; -hos jî latînî di mana malê de ye; yanî "mala agir". Ihtimaleke mezine, ku kral (mîrê mîran)

yan jî Xweda yê Xorriyan li wir rûdinişt û agirê pîrozî mezin jî li wir bû... Li vir peyva Xorasan jî balkeş e, eğer em şiroveka cüda bikin çawa dibe? Ku xor di vata: roj, agir-ar de ye û Xorriyan navê xwe ji wir girtine. -san jî zêdebûn (ek) ku cîh nîşan dike ku wê çaxê Xorasan tê wata welatê Xorriyan?! Gelo ev mumkune? Belê, ji ber ku di dirêjahiya dîrokê de gelên

li Xorasan, Arran, Arrhos, Hatay, Fîlîstîne û Nuzî yê yek netew bûn. Ew jî Xorriyên kal û bavên Kurdên îro li Anatol, Xorasan û cîhê din dijîne...

Xorrî ji alî milet yan jî şaristaniyen din ve jî bi Kurdan ve tên girêdan. Beysanoglû dibêje ew wek Subarî dihatin hejmartin û xwediyê şaristaniya yekemîn a li bakûrê Kurdistanê bûn. Li wir mirov leza dewleta Tirk dibîne ku çima dixwazin navendeka girîng a mîna Heskîfê rojekê zûtir têxin bin avê... Xelkê medenî yê yekemîn ê li jora çemê Dicle û bajarê Amedê jî di nav de Xorrî bûn, ku ji Subariyan dihatin hesibandin.(13750) Avakirina şaristaniya yekemîn girîng e, lê coğrafya ku hafi nîşandayin bi dîtina min kêm e. Bi taybetî jî dora herdû çeman û heyva bi bereket bê gotin hîn zêde mantiqî ye. Hinek dîtinen din jî wê rast dikin: Welatê Xorriyan (bi Asûrî ve re Naîrî tê gotin) ji bakûrê Meletî heta Hewlêrê û ji bakûrê Zê heta nêzîkî Wanê dirêj dibû. Hîn li bakûr jî êlên Ûrartûyan hebûn.<94~13) Niqta din ê ba^ş jî Xorrî û Subarî wek be§ên hev tenê îspat kirin. Wek tê zanîn Subarî li başûrû gola Wanê bûn û îhtîmaleka mezine ew Kurdên nişteCîf^n ku koçber nebûne. Lê bi lawazbûna dijmin re ber bi başûr dirêj bûne. Gelek dîrokzan wana wek Zebarî yên îro nîşan didin. Eger mirov kûr bifikirê di wir de coğrafya ku Xorrî lê belav dibin, hema hema cîhê ku îro Kurmanc lê nişteCîh in nîşan dide. Gelo Xorrî bav û kalên Kurmancan giştikan bûn an tenê dê û bavên Kurdên îro li dervayê welat dijîn bûn? Ew pirsa hîn zêde lêkolînê dixwaze... Lê kesên pispor wê coğrafya yê wiha radigihînin:

Robert Braîdwoodê ku li ser coğrafya Kurdan lêkolîn kirî dibêje: Çandeka mezin li ser wire û va coğrafya ji Libnana kevn û çiyayên Libnan jî dike nava xwe û ber bi Derya Spî dirêj dibe. Zozanên Anatol û Iranê dike nava xwe, Zagrosan û heta başûre Mezopotamya dadikeve.(94'24) Ew çanda hevbeş îşareteka pir mezine ku gelé Kurd ji berê ve, yanî herî kêm pêne hezar sal in ku li ser axa xwe dijî, derdixe holê. Li ser vê babetê dîtinen

din jî wiha ne: Li bakûr: Qefqasya, Antî Toros; li başûr Hewlêr, bakûrê Sûriyê; li rojhilat çiyayên Med, Urmiye; li rojava çiyayên Amanos bûn.(9484) Welatê Xorriyan ji çiyayên Zagrosan heta rojhilatê başûrd Anatolê û heta Sûriyê dirêj dibû.(137S0) Eger wî lêkolînerê hêja li cîhên mîna Xorasan, başûre Derya Kesk û bakûrê Derya Reş jî lêkolîn kiribiya, îhtîmaleka mezine, ku ew cîhana jî bi coğrafya Kurd û Xorriyan ve girêbidana. Iro ji bo wê dîtine îspata mina yekemîn ewe, ku gelé me yî li Xorasan digot em pêne hezar sal in li wir dijîn û avahiyên kevne li Xorasan in. Bi taybetî jî xaniyên kevne di zinaran de hatinî çêkirine li ser çiyayên bakûrê Xorasanê ku mezinan digot ew ji Kurdan de ma ne... Ispatên din jî emê di herikandina pirtûkê de bidin.

Ji zankoya Frankfurtê arkeolog Prof. Jan-walke Meyer, bajarê Xorriyan Tell Chuera ku pêne hezar sal dîroka xwe heyî dît. Ew li navbera sînorên Tirkiye û Sûriya îro de derxist hole. Ew herêma ji bo dîroka Kurdan gelek girîng e û di wê baweriyê de me ku li peşârojâ hîn zêde pelge û îspat ê derkevin. Di wî bajarî nûjen de qesr, perestgeh, embar, mal, cîhe zibil derketin û di dora bajer re jî du sûr hene. Bajar li ser 90 hektarî hatibû avakirin û 15 hezar §êniyê xwe hebûn. Niqta dinê girîng jî, ew bajara bi hesp rojekê ji serbajarê Xorriyan ya bi navê Waschukannî dûr e. piraniya bajaran di navbera çemê Xebûr û Balik de hatibûn avakirin, lê taybetmendiya wî bajarî ew bû ku bajar bi plan hatibû avakirin.(,89) Li ser erdnîgariya dora Heleb, Riha, Dîlok, Meletî, Semsûr (Prof. Andery Alfoldî dibêje: Welatê Xorriya Kummuhiyan jî Semsûrê. Grek navê Kommagene lê dikin) û derûdoran wan bi hezaran cîhên xirav bûye ku di bin de dîroka Kurdan ya kevne radikevî heye û li hêviya lêkolînerên Kurd e. Ew cîhên ku lêkolîn hatinî kirin de jî gelek belgeyên dîroka Xorriyan ronî dikin hatin derxistin ku mînaka berbiçav bajarê Alalah e...

Ji bo herêma Semsûr nûserê herêmî dibêje: Ji hestî û kevirên ku 5000¬4000 sal BI derketî de têye fêhm kirin ku li herêma me gelé bi navê Xorrî jiya ye. Dîsa ji encama kolanên Aslan Tepe yê li Meletî hatî kirin de derket holê, ku Xorrî ye 5000-4000 sal BÎ di dema kevir de; 3000-2000 sal BÎ de jî dema madenî jiyane. Xorrî 3000 sal BÎ li Haranê, di navbera 3700-3500 salan de jî li Dîlokê jiyane. Ew yeka ji seramîkên rengîne derketî hate fêhm kirin. Piştî Naram- Sîn, Xorriyan, herêm bi giştî kirin bin kontrola xwe. Hemwelatiyê xwe Subarî jî kirin bin desthilatdariya xwe û heta Kerkük û Derya Spî û Welatê Kenan çûn. Li vir xala girîng ewe ku; Subarî jî kirine bin desthilatdariya xwe. Wê çaxê derdikeve holê ku -eger Kurd bûyina Subariyan raste- Xorrî ne Kurmanc gîştik in... Ew wata jî derdikeve ku Xorrî konfederasyoneka êlên Kurd bû û birayên xwe kirin bin desthilatdariya xwe. Li Asya pûşîn, di navbera salên 1800-1500 an BÎ de bûn welatekî bi hêz. Tê gotin ku rêvebertiya Hîksosên heta Misir çûyînî de jî Xorrî hebûne.(137‘54) Di kolanên li Anatola Navîn de, gelek belgeyên ji Xorrî, Hîtît û Mîtaniyan de manî derdikevin. Îhtîmalekê ku ew ji dema 1800-1500 BÎ ve mabin. Ji bo ku hîna jî em ji dewleteka vana bi nav bikî û di muzeyan de veşerin dûr in; dewletên serdest gor kêfa xwe bi kar tînin. Li gundê Omê (Sêvikî) sêniyek derket ku gor texmîna min ji dema Xorriyan yan jî ji dema Hîtîtan ve ma ye û cilên wê demê, bi taybetî jî sol/mêrisên (kaloş- çarixên) wê demê bi yen Kurdên koçber ve dişibine hev...

Birêz Xemgîn dibêje: Berdewama Gûtiyan Xorrî bûn. Lê 3000 sal BÎ hîna ku li bakûrê Mezopotamya bi cîh nebûbin, li herêmê êleka din a Kurdên bi navê Sûbarû hakimê wê cografyayê bû/4''00' Hema nivîskar bi berdewamî dibêje: Hatiye îspatkirin, ku va gela berê li navbera golên Wan, Ûrmiyê û Ezerbeycanê de dijiya. Xorrî jê wê demê di navbera Ezerbeycan, Anatoliya Navîn û Hemedanê de koçber dijiyane. Rastiyeke

ku ew gelayî 2000 sal BÎ li vê herêmê nişstecîh dijiye û gelek dewletên bajarî, yan jî êlî ye avakirine. Berî Xorriyan tu

gelên dinê li vêderê dijîne nihatiye tespît kirin.<41,,2) Di nava nûseran de tam lihevhatinek tunebe jî, bi dîtina min ew bi nîvkoçeriya Xorriyan re girêdayî yê. Cama li bakûr, cama jî li başûr tespîtkirina van divê bi vê yekê re girêdayî be. Êlên Xorrî 2000 sal BI li bakûrê Suriyê, Kizzûwata (Çûqûrova), Amîk û li Anatoliya Navîn belav bûn. Vî gelî li bakûrê Rojavayê Iranê yê îro dewletên xwe çêkirin û ji wir jî ber bi rojava belav bûn. Gelek dewletên bajarî ava kirin: Wek mînak, Arrafa, Nûzî, Amûr, Kargameş, Urkîş (Amûda) û Taifa (Li deşta Mêrdînê) û herêmê xwe mîna; Amedanu (Amed), Hanigalbat, Pûlûrûmzî, Alzî û Işûwa bû.<58) Asûriyan ji vî gelî re Sûbarî digotin. Gorî Subariyan jî, Xorrî bi gelên Zaxrosan Gûtî û Kası yan va di têkiliyên nêzîk de bûn. Du hezar (2000) sal BI di du kevirên bi nivîsên Sumerî de qala welatê Kar-da-ka tê kirin ku li başûre Gola Wanê tê hesibandin. Ji wan nivîsana hezar salı bi şûnde jî, Tiglath Pîleser bi qewmê Kur-tî-e re li çiyayê Azû şer kiriye. Aramiyan ji herêma Botan re digotin Bes Kardû.<51) Di belgeyên Fermandariya Gîştî ya Tirkiyê de, ji herêma çiyayî ya li bakûrê Ava Botan re "Welatê Kardûkan" tê qal kirin. Navê Cizîrê yê kevn, Kardû Gazartasî ye. Ermenî jî ji herêmê re "Kerdûh" dibêjin.(44) Gor Dr. Akbûlût jî, 3000 sal BI êlên şervan li navbera Dicle û Firat de bi cîh bûn. Di belgeyên Sumerî û Akadiyan de ji welatê wan re Sûbarû, ji gelé re jî digotin Sûbarûyan. Xelkê herêmêyî yekemîn î nûjen Xorriyên ku ji Sûbarûyan tên qebûl kirin in. Demeka dirêj ev êlana di bin navê Xorriyan de jiyan, lê di salên 2000 an BI de, wek Xorrî û Mîtanî bûn du bir. Li destpêkê Xorrî bi hêz û mezin bûn. Paşâ jî Mîtanî bûn kraliyeteka mezin û bi hêz. Ji Mîtaniyan şûnde Asûr, Urartû, Med û Iskît (653-625 BI) hatin.(61) Ew bir bûna Xorriyan gotina kalê me tîna bîra mirov ku digotin:

Kurmanc bûne dû biran yek Mil yek jî Zil. Ew beşbûna heta vê demê dirêj dibe an na, nayê zanîn.

Xorrî heta sala 1340 an BI de serbixwe jiyan û piştre serdestiya Mîtaniyan qebûl kirin. Ji 1200 an, heta 700 BI jî Frîgya bûn serdest û heta serdema Medan ew berdewam bû.(85/4 99) Gor belgeyên heta îro derketinî holê, dewletên Xorrî û Mîtanî feodal bûn. Erd di navbera prensên xanedan, mîrên zend û élan de hatibû parvekirin.(137'59) Ew parvekirin bi sîstema birêvebirana êlên îro li Anatolê dijîn ve hevdû digre û xuyaye ku berdewama hev in. Arkeologê Fransiz Schaeffer 12 km li bakûrê Lazkiye, 40 km li başûre Hatay, li lîmana Ugarît û girê (hoyuk) Ras Şamra alfaba Ûgarîtan ya ji 1850 salan BÎ dît. Zimanê wan piranî bi zaraveyek Samî bû. Hinek jî tablet bi zimanê gelé li wir nişteciîh yê Xorrî bûn. Ugarît bajarekî girêdayî Xorrî û Mîtaniyan bû.(941ü) Ew belge jî nîşan didin ku Kurd li wir nişteciîh bûne; îro jî li heman cîhî Kurd hene, lê pir heyfe ku ew hatine asîmîle kirin.

Prof. E. Cheîre, li başûre rojava yê Kerkûkê kolanê kirî de bajarê Nûzî derxist. 4000 tabletên li ser hiqûq, rêvebirî û kar ê li wir derketinî yên Xorriyan bûn û 2000 sal BÎ hatibûn nivîsîn.(941ü) Wekî me li sernivîsa nifûs de jî nivîsandî Kurd gelé li herêma heyva bi berekete nişteciîh in.

Wadîe Jwaîdeh dibêje: Gel en mîna Gûtî, Lûlû û Kasiyan ê ku li çiyayên

Zagrosan dijîn, gelé herêmê yên herî kevn in û wan gelana hemû bi Elam ve mirovên hev in. Gel e cara yekemin li rojhilatê Torosan bi cîh bûyî jî Xorrî bûn û tê fikirkirin ku ev jî ji koma Elaman bû.(65) Bi vî awayî té xuyakirin ku Xorrî xelkekî pir û li cografyeka fireh jiyaye. Ew revvşa hanê jî gelek pirsan bi xwe re derdixe holê. Gelo Xorrî weqas pir bûn, yan jî şaristaniya wan pir peşketî bû û ji bo wê gelek belav bûn yan jî xelkekî koçber bû ku ji bo ajelan û ji ber dijminan tim cîh diguhartin? Bersiva vê ji alî Xemgîn ve wiha tê dayîn:

Di navbera 4000-3000 sal BÎ de Xorrî ji Ezerbeycanê heta Anatoliya Navîn, ji wir jî heta Hemedanê, di herêmeka pir fireh de nîv koçber dijîn?4 99) Dîtineka balköş e. Gelo çima nîv koçer dijîn? Eğer mirov şertûn wê deme bîne ber çavan û kêdikirina ajelan û bi wan ve debara xwe kirin, divê karekî pir bi istîfade be... Mirov dikare bibêje ku karê vê demê yî herî bi kelk-kar pez xwedîkirin bû. Kurdên ku îro jî bê pez nikarin bijîn û çandeka mezin a ajelan afirandî, wê demê ji bo wî karî diçûn zozanan û ew jiyana 5000 sal in berdewam dike... Eğer mirov Kurd be, yan jî rûhiyeta Kurdan (taybet jî yê koçberan) baş nirxandibe dê heq bide vê ditina min. Li navenda Anatolê jiyana wan ji alî seramîkên ji kolaneyên Alaca derketî holê de xuya dike ku 3000 sal BI Xorrî li Anatoliya Navîn jiyane.14'99* Dema min di kovara Veger de ew yeka nivîsî gelekan qerfên xwe kirin lê dîrok vê yekê eşkere dike. Wekî min berê jî gotî; hîna jî belge derdikevine, lê ew ji alî kesên nezan ve tenê derxistin û di malê kesan de tenê vöşartin. Li pöşörojâ ew yeka hîna jî eşkere bê dîtin. Hinek jêder û belgên din jî nîşan didin ku Xorrî hemû ne koçer bûne. Yên nişteclh ên bi miletên din re şer kiri û piştre tevlî birayên xwe koçer bûne jî hene.

Lewra belgeyên ji herêmê derketinî didin nişandan, ku dema Akadî li navîna Mezopotamya bûn desthilatdar, cîranên wan li bakûrê rojava, bakûr û bakûrê rojhilat Xorrî bûne. Ew yeka ji levhê bi zimanê Xorrî yê li bajarê Kiş ê derketinî hatin îspatkirin.(4 99) Ew jî dide îspat kirin ku berî Akadî bên yan jî bi hêz bin Xorrî xwediyê başûre Mezopotamya ne. Niqta ji alî dîrokzanan ve hîn bi tevahî nehatî pejirandin ev e; yanê Kurd ji wê herêmê mecbûrî çûyîna bakûr û bakûrê rojhilat bûn. Ev yeka di her dema dîrokê de pêk hatiye: Kralê Babîl Hammûrabî (1792-1750 BÎ) dew'leta Asûr xeland/xiravê kir bi şûnde bi Xorriyan re şer kir û ew gela ber bi jor, bakûr ajot.(4 ,02) Ew bûyereka ku ji alî her kesî ve tê qebûl kirin e, lê kes naxwaze bêje ku ew Kurd bûn û koçber bûn. Ji bo ku Kurd di saha siyasî

ya cîhanê de ne xwedî gotin in, ew neheqî li vî miletî tenê kirin. Di wê demê de bi pêlekî nû ya ji Amorîtan pêk hatî, gelé kevn bi hêz kir û qedera wî hezar salan ket destên Samiyan. Dewleteka monarşîk a central a bi hêz avakir û gelek belgeyên Sumeri wergerandin û belav kirin.(66) Di dema kralê Asûr Şemsî Adad (1748-1716) de, kralê Babîl Hammûrabî (1728-1686 BÎ) û xanedana Misirê yê XII an de ji herêma Xorriyan koçberiyekê destpêkir û xelk çû Anatolê herêma Hîtît lê bi cîh bûnî û bakûrê Sûriyê. Ew koçberiya hanê ji dora gola Wanê, Zagrosan û bakûrê Dîclê derket û hêdî hêdî dom kir. Xorriyan di sala 1760 an BÎ de li ser herêma di dest Asûrayan yên di nava Dîcle

û Zê re erişen bi hêz dikirin. Di dema Hammûrabî de li Sûriyê dihatin dîtin.(94‘ 2°8) 0i van belgeyên dîrokî de jî vekirî derdikeve holê ku Xorriyên li heyva bi heyî nişteciîh ji her alî de rastî erîşan tên û mecbur dibin ku cîhên xwe terk bikin û ber bi bakûr û çiyan hilkişin. Ev tespît ji bo me pir girîng e. Levvra; koçberiya Kürden îro li dervayê welat û yên li Anatoliya Navîn ji vê demê dest pêdike... Hinek dikarin bêjin îspata wê çi ye? Kevirên ji herêmê derketî, zimanê Kurdên li dervayê welat î di forma kurdiya kevn de, çanda hevbê§ a derketî holê hinek ji wan in. Di beşa Sakan de li ser wê koçê emê hinekê fireh rawestin.

Mumkune, ku bê gotin çima tenê ew welata rastî örîşan dihat? Ne tenê li welatê me, welatên bi heyî hemû rastî ew ârîşana tên. Di roja îro de jî, welatê dewlemend her çiqas rastî êrî§ên bi vî rengî neyên jî, rastî hatina penaberan tên... Eğer ji alî eskerî û civakî ve, ew welatana ne bi hêz bûyana, dikaribûn rastî êrîşên eskerî jî bihatana. Ji ber ku welatê kalên Kurdan yê li ser maden, riyên ticaret, cotkarî û ajaldarî ye pê§ketibû, ji çar aliyan ve bû sedema êrîşan. Di navbera salên 2000-1500 an BI de, konfederasyonek ava kirin, lê bi qasî Hatiyan bi ser neketin û navendî nebûn.(72)

Bajarê Urkî§ê li rojhilatê Dicle cîhê herî kevn ê Xorrî lê nişteçîh bûne û li nava 3000 sal BI li bakûiê Xabûrê (Heskîf?) derbasî jiyana rûnişkandire bûn. Belgeka Xorriyan li Kultepe hatî dîtin de dinivîse, ku Xorriyan derdora 2000 sal BI de li Anatolê dewletên biçûk avakirine.(4) Ew dewletên biçûk mirov dikare wek dewletên federasyonên élan fêhm bike. Dewleta Tirkan ku dixwaze Heskîfê di bin avê de bifetisîne, sedema vê jî ewe, ku desthiladar naxwazine ku ma çand, dîrok û koka Kurdan eşkere bibe. Iro ji ber vê ta û janê, ew hewl didine ku wê şaristaniyû rojekê zûtir bikujin ku têzên xwe yên pûç û pelax berdewam bikin...

Li Kilîkya yê, Xorriyan BI 2100 an de seramîka rengîn bi pêş xistin. Dîsa li Meletî, Elezîz û Mûşe jî ew seramîkan derketin û tê wê watê ku Xorrî li vê herêmê hîn zû bi cîh bûne. Gelek belge didin xuyakirin ku va xelka 2000 salan beri BI li vir jiyaye; bajar û dewletên élan avakirine. Beri vî netewî ti işaret tunin ku netewekî din li wê herêmê jiyaye. Gelek belge, name derketin holê û ji wan di yekê de, vekirî tê gotin ku ji Meletî-Me^ê hetanî Derya Spî dewleta Xorrî ye.(4) Li dervayê sûrên Kerkük û Nînova, M. Mallowan kolanê kirî de raste kav/flraq û kacaxên Xorrî û Mîtaniya hatiye.(94 67) Li Meletî, Elezîz, Mûş, Erzirûm, Kaxizman, Wan firaqên Xorriyan yên 3000 sal BÎ hatin dîtin.(94 79>

Me li jor, ji Xemgîn ragihand ku Xorrî di dema Hammûrabî de, carna jî tê nivîsîn ku 3000 sal BI ew ber bi rojava çûne; 3000 sal BÎ de li dora gola Wanê belavbûna Xorriyan ya ber bi başûr û rojava destpêdike. Li rojava heta Toros û Kîlîkya ye çûn û li wir kraliyeta Hîtîtan tehdît kirin. Li Kîlîkya herêmeka bi navê Kizzûwatna hebû û payîtextê xwe bajarê Kûmme (Osmaniye?) bû. Gel e li wir jî ji Xorrî û Lûwiyan pêk dihat û bi Xorrî dipeyivîn. Abdulhamdî Toplû, vê dipejirîne lê qala Lûwiyan nake.<27) Mumkune ku ew koça çend caran jî pêk

hatibe, lê yen hatinî tespit kirin nika ew in. Xuyaye ku Xorriyan bi Lûvviyan ve di nava aştiye de jiyane; lê Lûwî kî bûn? Mihotûlî dibêje: "Gelé li Anatole yê heri kevn Lûwî ne. Ew jî ji koma zimanê Ariyan in û di zimanê wan de tê wata "welatê cîhê bilind." Fûş Anatolû bibe Helen, Lûwiyan di heykelên yezdaneyên xwe de xweda yê tirî Tarhûzza bi kar tanîn. Ji ketina Troya şûnde, hesin û tune kete dest Heîenan û êdî bûn hêzeke li hember rojhilat. Heta Fi rat Helenizm pêk tê. Lûwî ji holê radibin, Frîgya û Lîdya jî vê qederê parve dikin. Lûwî bi Hatiyan ve mirovê hev bûn. Di sala 1200 an BI de li împaratoriya Hatî nivîsa Lûwî ya hiyeroglif (vvêne) bi kar dihat. Ew zimanê gelé bû; lê nivîsên din bi Akadî, Asûrî û Xorrî bûn.<87'%) Ez di vê baweriyê de me ku Lûwî jî êleka Kurd bûn; şerû Troya jî şere Grek û Kurdan bû. Di filmé Troya de jî îşareten vê hene, di vir de serê jinên di malbata kraltiya Troya de bi zêrên îro Kurdên Xorasanê bikar tînin girêdayî ye ku gelek balkûş e. Dîtina dinê girîng jî ew e ku dibêje: Xorrî, 2300 sal BÎ ji çiyayên Sabalan (başûre Derya Kesk) hatin û mîrîtiyên bajarî ava kirin. Di cîhekî din de jî dibêje: -Li bakûrê Sûriyê û rojhilatê vêderê, hebûna Xorriyan ji 2300 an Bi vir de tê zanîn- Di salên 1500 BI de jî, li bakûrê Sûriyê dewleta Mîtanî avakirin; gelé vê dewletê jî Xorrî bûn. Komek mirov hatin û ew birêvebirin. Ewên ku va dewleta çêkirin û birêvebirin zimanê xwe mîna Irani ya kevn e. Mîtaniyan ragihandina xwe bi zimanê Xorrî dikirin. Heta baweriyê bi çend Xwedayên wan tanîne.l8(,) Bi dîtina min Xorrî ji Xorasan heta Fîlîstîn diçûne û dihatine. Ji bo vê jî navê bajarê Tehran a kevn 'Rê' ye. Ango ew li ser riya çûyîn û hatine bûye. Yek jî bi hatina Ereb û Asûriyan re Kurd ber bi bakûr, bi taybet jî dora Derya Kesk ve çûn. Ji bo vê ji destpêka dîrokê ve, ew herêma warê Kurdan e. Gor rewşa avûhewa û gelên erîşkar, ew carnan dihatiye guhartin; lê xeta bingehîn ew e, ku Kurdên-Xorriyên di navbera Xorasan û Filistîne de nîv koçer bûne.

Ji nameyeka derketî tê fêhm kirin, ku di navbera Mereş, Meletî û Derya Spî de dewleta Xorriyan ava bûye.(4) Ew name beşekî Xorriyan dide xuyakirin, lewra wana gelek bajar-dewlet avakirine û piraniya wan jî di nabera Derya Spî, Firat û bakûrê rojavayê Sûriyê de bûne. Wekî din jî li her alî Kurdistan dewlet û warê wan hene. Ji wê mektûbe jî xuyaye ku Kurdan bi dilê xwe cîhên xwe terk nekirine û bi zora dijmin ew ber bi bakûr ve çûne. Lê ew îddea ku Xorrî bi rêyeka aştiyane hatin başûr zêde ne di cîh de ye: Xelkê Xorrî ji gelek élan pêk dihat û li başûr û rojhilatê Derya Kesk dijiya. Wek êl û zendan ji wir ew hêdî hêdî û bi rêyeka aştiyane hatin Mezopotamya.(94140) Xelkê bi darê zorê ber bi bakûr hilkiştî bi rêyên aştiyane ne; lê mumkune ku ji sistbûna dijmin sûd wergirtibin û dîsa jî hatibin cîhên xwe yên berê. Di vê vegera bı İsrar de qe rekte ra Kurdan ya ku welatê xwe terknakî der d ike ve peş. Hîna jî ew İsrara vegera welatê xwe berdewam e. Yekê jî sîstema wan ê civakî û maldariya wan jî ew mecbûrî vê dikir, lewra ji bo ajalên wan zozan û beriyên heri baş ê li Kurdistanê bûn. Sîstema wan ê rêxistinî jî wan dîtinana û belavbûna wan ê li coğrafya fireh dide îspatkirin. Ji bo wê ew hertim bi hev re tevnedigerîn,

carnan di aliyên cûda de jî diçûn. Yanê belgeyên li Kerkük û Meletî û cîhên dinê jihev dur derketinî vê didin xuyakirin.

Gorî dîtina W-N Ton, Xorrî ji çend birran pêk dihatin û welatê wan rojhilat û başûre Derya Kaspî yê bû. Wana ber bi bakûrê Mezopotamya belav bûn û 2000 sal BI heta çemê Diyala dirêj çûbûn.(,1) Bi dîtina min, mirov ji şûna welatê wan re bêje cîhê wanî zozanan yan jî cîhê wanî demên teng baştir e. Lewra Kurd ji bo ajalên xwe û ji bo ewlekariya xwe diçûn vê herêmê. Ew birrên ku tenê qalkirin, îhtîmaleke mezine, ku federasyonên êlên Kurmanc bûn. Heta salên 1500 an PI jî ew jiyana federasyonî berdewam dikir û carna jî li hember dijminan, ew dibûn konfederasyon û dewlet...

Dr. Hellmut Chrîstoff jî ji bo Kurdên ku zivistanê diçûne Sûriyê û stebên Mezopotamya û li başûre Torosan ajel xwedî dikirî re dibêje Kurdên ku mîna eslê xwe manî; evê din jî mîna wan bi nav dike û wek mirovên baş nîşan dide. Dema diçûn Sûriyê her tim bi Bedewiyan re şer dikirin. Carna bi Ermeniyan ve di zivistanê şâk/dijwar di şikeftân bin êrde de derbas dikirin û ji bo yemî ajela jî tim bi hevra diketin nava nakokiyan.(I2) Çiqas balkâşe ku heta sedsala dawîn jî ew rewşa hanê berdewam dikir. Kurdan bi Erebên ji bo şêlandinê ji başûr dihatî re şer û pevçûn dikirin. Bi Ermeniyan ve jî gelek caran hevkarî dikirin, gelek caran jî nakokiyên ji bo berjewendiya, di navbera wan de derdiketin. Heta îro li navenda Anatolê ji bo vê çîrokekê heye ku tê qalkirin.

Prof. J. Friedrich dibêje: Morfolojiya zimanê kurdî bi morfolojiya zimanê Xorrî ve hevdû digre. 2000 sal BI va xelka li alî bakûrê rojava yê Mezopotamya, bakûrê Sûriyê jiya ye.(12) Di alî ziman de jî yekbûna wan ti gumanê nîne ku ew ji yek netewê ne. Torî, coğrafya vî zimanî ji wiha nîşan dide: Zimanê Xorrî li destpêka 2000 sal BI di navbera Gola Wanê û Firatê de dihat deng kirin. Çemê Firat di navbera Hatî û Xorrî dipeyivî de sînor bû. Xorrî diket nav koma zimanên Hînt-Ewrûpa, Hatî jî diket nav koma zimanên Asya Peş. Xorrî bi Urartûyan ve tê gotin ku ji sedî sed ji heman bapîran bûn û zimanekî nêzîkî hev bikardianîn (Torî). Mumkune ku ew bi zaravê zimanê kurdî axêf bûn; wek Kurmancî û Kirmanckî.

Dîrok, jiyana civakî, belgeyên ji xirbeyan derketinî hemû yekbûna Kurdan û Xorriyan didin îspatkirin. Aliyê Xorriyan yê çandî jî vê yekê hîn bi hêztir dike. Bi taybetî jî zimanê Xorrî û kurdî gelek nêzîkî hev e, yek e. Li ser ziman Torî van agahiyan dide: Çanda Xorrî û Kurdan ji 11000 sal BÎ vir de bi

berdewamî hevdû digre û ji belgeyên arkeolojik bigre hetanî hevdû girtina ziman de gelek belge hene. Gramatîk, morfoloji ya zimanê Xorrî wek kurdî ye, wekhevbûn nîşan dide ku kurdî ji Xorrîtî tê.

Xorrî	Kurdî	Xorrî	Kurdî
Bawr	gewr/mor	urh	rast
Man	man/bûn	tal	dar
Ard	grind	lut	jin
Gavt	ceh	gult	gav
Elm	sond	sêl	heyv
Sêr	şev	şîr	du
Zêl	cerg/kezebard		dan
Ahr	qehr	hubr	dû/dûman
Egî	sar	eka	yek
Panca	pêne	pitq	pituk/dergûş
Henna	hema/niha	has	hîs (9417/21 >.

tleta vir me j i dîtineyên cûda îstîfade kir; van dîtinan nîşan û îspat kirin,

ku li cografyayên cûda dem bi dem dewlet û desthiladariya Xorriyan ava bûye. Ji bo me xeleka girîng, gor işaret û belgeyên derketî, Xorrî kalên Kurdên îro li dervayê welat in -koçber in-. Ew li cîhekî ku ji coğrafya Kurdistanê ya îro hê firehtir jiyane. Lê ji ber erîşan cama ber bi jor carna jîbi milên din de fi reh bûne. Gelek dîrokzan hemfikirin ku Xorrî zendêkî (federasyon) élan bûn, yan jî wek konfederasyon dijîn. Xuyaye ku di demên teng de dibûne konfederasyon û di demen aştiye de jî wek federasyona élan jiyane. Ji bo vê jî gelek dewletên bajarî avakirine û kêm

navendî bûne. Xorriyan wek êl hebûna xwe berdewam dikirin. Ew dîtin ji alî kesên din ve jî té parvekirin: Te zanîn ku bûn nîv dewlet jî. Ji kolonyalîzma Sumeran şûnde bûn xwediyê dewletên bajarî. Ev jî mînakên mîna, Ûrkîş, Nûzî, Urfa û Samsat ve té zanîn.(75)

Heta demên dawî jî li Anatoliya Navîn êl wek sîstema federasyona dijîn; her êlêkê serok û ci va ta rûspî yen xwe hebû; dîsa di ci vaka mîrêmîran de jî serokên her êlê amade dibûn. Rêvebiriya Xorriyan wekî me got: xwe mîna bajar-dewlet bi rêxistin kiribûn. Ez vê sîstemê wek êl-devvlet dibînim. Heta sala 2000 an BI jî wart dewletan xwe li bakûrê Mezopotamya û Sûriyê parastin. Hemû bajar-dewletên Xorriyan ji Zagrosan heta Derya Spî belav dibûn. Xemgîn: Di nivîsa hezar û 1900 sal BI de Meletî wek Mîlîda derbas dibe û qala bajarekî bi navê Samura ya li kelêka Firat jî tê kirin.(4'U9) Di dema Akad de bajar-dewletên Xorriyan ev bûn: Hîbîlat, Gûmarsî, Mardaman, Nawar, Rûmûs, Samrûm, Şerşî, Satarsa, Sîmarûm, Sîmamûm, Urkîş (Amûdê 2000 BI Paytexta Xorriyan e), Ûrblûm (Hewlêr) bûn. Di dema Babîla kevn de jîbajarên mîna: Arrafa (Kerkük), Nûzî, Mûkîş, Amûr, Taîte, Waşşûkkanî, Kargameş û Urkîş lê zêde bûn. Di dema Asûr de jî bajarên li bakûrê Dîcle ev in: Paphî,

Kadmûhî, Bûssî, Alzî, Madana, Nîhanî, Alalîa, Tûbûrzî û Pûrûlûmziy bûn. Li bakûrê Sûriyê jî Alalah, Urşû, Haşşû, Ugarît, Gûbla, Qatna, Qadeş û Kinza bû. Li Zagrosan jî: Zamûwa, Zohap, Zîhaw, Helwan, Namrî û Haşmardî bûn.<94'83) Ji Zagrosan heta Derya Spî bajarê Xorriyan ye girîng Arrapcha, Nûzî, Mûkîş, Armûr, Arapa, Hanîgalbat (Bakûrê Sûriyê) Taite û Karkamîş (Mereş) bûn.(II)

Heta vir me hewl de ku li ber çava raxin Xorrî kalên Kurdên koçber in. Lê belgeyek heye ku mirov nikare ji vê zêdetir aşkare û îspat bike ku koka Kurdên koçber û Xorriyan yek e. Xwezî îmkan dest bida ku me ew bi wêne

jî pâşkeş bikira lê îro ev ne mimkune. Em bi vê hêviyê ne, ku ciwanên me û rewşa dinyayê ku tê guhartin rojekê wê jî û belgeyên din jî derxe ronehiya mirovatiyê. Di kolandinên li Alalah (Bakûrê Sûriyê/Helep) de kevirekî bi zimanê Xorrî yê li sala 1650 BI hatî nivîsîn derket. Di wî kevirî de: navê mehên salé, agahî li ser gelên dinê li dora wan û agahî li ser Xorriyên Helebê dijîn ku ji wan re Çûxreşiyan dihate gotin heyî derket! Berî her tiştî em pey va Çûx-reşî-yan zelal bikin. Çûx, basme ku li xwe dibî, yan jî wê çaxê fistanê ku bi ris (hirî) didrûne.. Reşî jî federasyona élan ya bi nav û deng e. Mirov dikare bêje ku: Reşî yên çûx li xwe dikirî yan jî ewên ku çûx didrûnî û difirotinî... Gelek êlên Kurd ên navê xwe nêzîkî vê jî hene, wek mînak: Ebareşan, Kumreşan, Qotreşan

Ci hwd. Gelo îro jî ew êla hene? Belê. Di heypeyvîna min (2001) bi rehmetiyê Prof. Şeref Aşîryan (Rûsya) re kirî de, digot: Çûxreçî li bajarê Grasnadarê de îro jî hene, ola wan Ezidiyatî ye û pismamê Reşiya ne...îro ew ÇûxReşiyan e li Ermenîstanê herêma Flegezê, gundê Camûşwane, günden deşta Ara rate û Tiflîsê dijîn û Êzîdî ne. Taybetmendiya wan jî ew e ku ji jiyana azad hez dikin û tevlî êlên din nabin. Reşî jî li Tiflîsê, hinek li Ermenîstanê û deşta Araratê hene ku Ezîdî ne. Taybetmendiya wan jî ewe ku: hinekî ferdî ne, çanda xwe gelek xweş parastine û di alî çandî de azad in. Ji wê eşkeretir kîjan milet dikare dîroka xwe bide îspat kirin? Di gotina rehmetî de jî vekirî xuya dike ku ew Kürden Çûxreşî yen îro li Rûsya yê hem Kurd in, hem jî Êzîdî ne, hem koçber in û hern jî pismamên Reşiyane ku îro jî zindî û li ser piyane. Tene ew hevoka dîrokêka bi çar hezar salan dide ber çavan...

Gor belgeyên ji Alalah û Boxazkoy derketinî, fermandarê artêsa bajarê Allepo-Helep navê xwe Zukraşî bû. Ew bi xwe ji Xorriyan bû.(11'26) Di navê wî fermandan de jî diyare, ku ew ji konfederasyona Reşiyan e. Dîsa gor belgeyên ku derketî; prensê Yerîsalemê (Qudsê) yê bi navê Arad-

Hedad navekî Xorriyan bû. Navê bi ar-agir dîsa balkeşe. Misiriyan ji bo Filîstîn digotin Huru û gelek nivîsên derketî nîşan didin ku Xorrî li wir jiyane.111'311 Li rojavayê Enqere gorekî Xorriyan hate dîtin, ji ber ku Xorriyan mirî dişewitandin û dikirin kûpan û wê çaxê ew sîstema hîn li Anatole bi kar nedihat.(11'27) Heta tê gotin ku bajarê Enqere jî navê xwe ji kurdî girtî ye; lewra di zaravê dimilî, soranî û şêxbizinî/ lerî de Engûr tirî ye.{71-39) Ew belgeyêna jî didin îspatkirin ku Xorrî berê li rojavayê Enqere jî jiyane. Ew belgeyên-sinî y a li gundê Omê derketî jî vekirî didin xuyakirin ku ew li wir jiyane. Mirov dikare wan sînoran heta Derya Ege jî fi reh bike.

Gelek belgeyên bi Xorrîtî hatî nivîsî yê ji salên 1500-1300 an BÎ de manî jî li Raş Şamre, Tûnnîp, Qatna û Alalah derketin û alavên Xorriyan bûn. Gel en li wir dijîn bi piranî Xorrî û Semîtîkên rojava bûn. Xorriyan bandoreka dinî ya xurt li ser Semîtiyan çêkiribûn.(94KW) Ihtîmaleka mezine, ku Semîtiyên wir Asûrî û Süryanî bin û di bin bandora ola Xorrriyan de mabin.

Xorrî di sala 1600 an BI de, ji rojhilatê Dîclê heta Kerkük, Silêmanî; ji wir başûre Sûriyê û heta Wan û Urmiyê kiribûn bin destên xwe. Lê di wan salan de Hatiyan bajarê Xorriyan ya girîng Heleb servegirtin. Di sala 1559 an BÎ de, kralê Hîtît Murçîlê yekem erîşî Babîlê kir û li vegerê dewdeta Xorrî ji holê rakir. Ji mirina Murşîl şûnde Hatî perçe bûn û di 1550 BI de Xorriyan dîsa dewlet avakirin. Kralê xwe jî Parattarna bû. Kralê duyem jî Saûtarna (1520-1480) ye û wê demê dewleta Misir û dewleta Kurd ê bi navê Kardûnaj di alî polîtîk de di astekê de bû(4>

Di dema kral Sausstar de Xorrî dewleta li Anatole ya herî bi hêz bû. Heta Kerkûkê di destê wan de bû û li gelek cîhan jî mîrîtiyên wan ên serbixwe hebûn. Bi Misir ve têkiliyên wan baş bûn. Kral Aratatma (1445-1405) keçka xwe da kralê Misir Tûdmozîs.(4"106)

Kralê Hîtîtan

Hinek kralên Xorriyan:

Xorrî Lûlû Gûtî Akkad

Arî Şan Anû Babanî Basîûm Sargon

Atal Şan 2800 Sa Ratîgubasin 1227-2221

Tîşarî — Enrîdûwazîr Naram Sîn

2200 Satûn Elûlûme 2196-2160 (94 309)

Piştî Saûtarna hate kuştin, lawê wî Arartama II (1390-1352) hat cîhê wî. Ji ber têkîliyê wî û Misir, di nava dewletê de serhildan derket û krai hate kuştine. Lawikê Tûsrata(52'1340) hat û cara yekem wî xwe wek dewleta Mîtanî û gelé Xorrî de nasandin.(4107) Sedema vê nasandina cûda bi dîtina min ew e, ku Mîtanî federasyoneka di nava Xorriyan de bûn. Dema desthilatdarî heynan destê xwe dewlet bi navê xwe xwendin û navê Mîtanî kete rojava dîrokê. Gel e Xorrî jî di wir de wek Kurmancan tê xuyakirin. Yanî rêvebirê dewletê yê ji êl yan jî federasyona êla Mîtanî ye, lé hemû wek Kurmanc tenê dîtin.

Kralê Asûr Addad Nîrarî (1275 BÎ) êrî§î Mîtaniyan kir; Mîtaniyan ji Hatiyan alîkarî xwestin, lê piştgirî ji wan re nehat. Mîtaniyan şer wenda kirin; Harran û Tûr Abîdîn kete destê Asûr û herder şewitandin. Piştî van şeran em êdî şeren herêmî dibinin. Xelkê Hanîbalgat raperîn kir û dewleta Xorriyan a biçûk avakirin lê Salamanasarê Asûr di sala 1250 an de ew ji holê rakir. Bi ser vê de xelk ber bi bakûr helkişt û dewleta Ararat (Urartû) avakirin. Dema

kraltiya Xorrî-Hatî ya girîng li Asya Peş hate hilweşandin, li hember eriş û çespandina dijminan, gelé li Filistin, Suriye û Mezopotamya koç kir û ber bi bakûr helkişt/871171 Ji vê deme bi şûnde edî Kurd hêza xwe li welatê

bav-kalan winda dikin û mümküne ku piraniya wan vê demê çûbûn bakurê Derya Reş û navenda Xorasan û Gola Aral... Ew yeka heta dem a Medan bi vî avvayî berdewam bike û Kurd êdî mecbûrî ciyan bibin...

Bajarê Alaca- Deriye Kral BÎ 1300

Dîsa di sala 1100 an de grûba Mûşkî dewleteka Xorrî ava kir. Di belgeyên Asûr de tê xuyakirin, ku beri Medan di navbera Hezar û Urmiyê de dewleta bi navê Manerê hatiye damezirandin. Di heman belgan de di wan herêmana de 2000 sal beri zayinê Med (Kurd) jiyane û ji bo ku ji hev belabune her tim rastı erîşan hatine.(;,2) Gor ditineka din jî va gela li herêma Meletî, Heleb, Semsûr û Wane dijiye û beri wan jî tu gelen din tunin. Bi dîtina birêz Burkay 3000 sal BT Mezopotamya welatê Sûbariyan bû. Sumeran ji wî welatî re Subir, Akad an Sûbartû digotin. Lé navê vî gelî paşê hat bi navê Xorriyan ve hate veguhastin û ji Derya Reş heta Zagrosan bûn hêza yekemin. Di sedsala XV an BI de jî li nêzîkî Antakya piraniya gelé Xorrî bûn û piştî Hîtît jî têk birin bûn desthilatdarê sînorên Kurdistana îro. Li rojava Kîlîkya û li başûr jî Sûriyê zept kirin û paytextê xwe bû Riha. Wê demê cîranên xwe li başûr Akad bûn û Mezopotamya di bin kontrola wan de bû. Fiîtîtiyan jî ji Qefqasan hatin Rojavayê Xorriyan bicîh bûn û Bogazkoy ji xwe re kirin pay text. 1800 sal BI Xorrî heta Misir, kembera Deryaspî jî kirin bin kontrola xwe.

Birêz Izady dibêje: Digel bi hakimbûna çandeke nû (Ubeydî) va li Kurdistanê re, Kurd bûn hakimê çiyan. Niha ji bo koka wan belgeyên qetî nîn in, Xorrî, piştî desthilatdariya Ubeydî yan 1000 salan bi şûnde, ya nîştedhen herêmên mat daxwaz diki, yan jî gelé koçber bûn. Lê tê fêhmkirin ku Xorriyan, di bin hêzbûna xwe ya çandî de gelên li Zagros-Toros di bin yek nasnamê de gîhandin hevûdû. Lewra li Başûrc? Kurdistan-Gûtîûm, Urartû, Alalah û

Hatûşaşe zaravayên cüda yê Xorriyan bikardihatine ku va hatiye îspatkirin'154' 70). Birêz Izady îddea dike ku; Ela Canpolatê ya bi nav û deng ji Qirna Navin vir de li Payas-Iskenderûnê dijî ye. Hebûna Kurdan ya li wir ne rastiyeka dem demi ye. Kurd ji kalên xwe Xorriyan vir de li Edene, îskenderûn û Antakya yê dijîn. Nivîskarê Roma, Pliny Mezîn, PI sedsala yekemin de êlên Kurden li wir rêzdike û qala Belikan û Bahraşan dike. Ew û gelek êlên din 1900 salan li wir dijîn.(l54‘36) Bê guman hebûna Kurdan yê herêmê kevne; lê di dema Asûriyan de êlên ku desthilatdariya wan pejirandin man, yên din ber bi bakûr hilkişiyan.

2000 sal BÎ, ji Qefqasan Hitit hatin û li rojavayê Xorriyan bi cîh bûn. Çanda Hîtîtan gelek di bin bandora Xorriyan de mabû, ni visa wan jî fêr bûbûn. Gor belgeyan, Xorriyan li salên 2300 an BÎ de li Kîlîkya bi cîh bûn û bi Gûtî, Kasî, Lûlû, Elam û Mar an ve heman netew in. Beşa heri mezin Xorrî bûn.(4‘ 100) Wekî tê ditin hemû jêder û nûser destnışan dikin ku Xorrî Kurd in. Di wê de ti guman nine û ez bawerim di demên peş de ewê hin zelaltir bibe. Pişti Xorriyan, Mîtanî yên ji navê derketinî dewlet avakirin û di dîrokê de rolên girîng lîstin.

MÎTANÎ (Marîannî-Mêranî)

Wekî tê gotin Mîtanî ji nava Xorriyan derketine; îhtîmaleke ku van ew perçe bûn van jî ji konfederasyon-dewleta Xorrî federasyona Mîtanî veqetî û dewleta xwe ya serbixwe avakir. Gelo mirov dikare bibêje ku ew têza ku dibêjin Kurmanc wek Zil-an û Mil-an bûn du beş, koka xwe ji wir digire? Îhtîmaleke. Lê dikare ji wir jî were ku konfederasyonekî mîna Xorriyan mohra xwe li dîrokê xistî di vê demê de parça bû û ew jî heta roja îro hat. Beta mirov dikare bipirse gelo navê Milan jî ji vir tê? Li derdora sedsala X an PÎ de jî perçebûneka bi wî rengî ye, di dîrokê de heye û têza nêzîkî rastiyê ewe, ku ew li wê sedsalê parçe bûn. Lê mirov dikare wê teza ji dema Xorriyan jî bi tevahî red neke...

Li ser navê Mîtaniyan Tori dibêje: Bi pir anî di pey va Sar Mîtanî û Mîtanî de derbas dibe. Ev peyva di vvata polîtîk û cografîk de paralel hatiye bikar hatin. Di nivîsên Boxazkoy de: Hur-la-as, Kur-e û Mî-ît-ta-an-nî bi Kur-kur-meş, Harı û Mît-ît-tan-nî ve cîh guhartî hatiye nivîsandin. Di vir de xuya dike ku Mîtaniyan xwe wek Xorriyan didaye nasandin.(<M"m) Ew rastî ya ji Xorriyan veqetandinê dide nişandan. Gelo mirov nikare wan navana heryekî wek federasyonê ku konfederasyona Xorrî tanînî meydanê şirove bike? Gor praktîka piştî du hezar salan ez vvê encame derdixim, ku Xorrî di destpêkê de konfederasyona sê federasyonên Kurd bun. Yekemîn Mîtanî jê veqetîn û serbixwebûna xwe îlan kirin.

Mihotûolî dibêje: Mîtaniyan xwe wek "Marîannî" ku têyî wata leheng bi nav dikirin. (Asuriyan ji vê re digotin Hanîgalbat).(871I4) Navê ku wan li xwe dikirî girîng e, di vir de peyva esil ziman û koka vvî netewî dide eşkere kirin. Ew navê esasî ye, yen dinê mîna Mîtanî bi piranî ji alî gelên din ve û piştre le hatine dayîn ku gelek caran ew tên guhartin. Peyva ji bo xwe bikartanînî jî formeka mêr-mêranî ya Kurmancî ye, ku hîna jî bikar tê. Mumkune ku ew koma ji êlên Kurd pêk dihatî gelek şervan bûn û ew navê mêranî li ser mabe. Mirov dikare bêje ku têkiliya wî navî bi bajatê Mêrdîn û konfederasyona Milan re jî heye. Lewra bajarê Mêrdînê dikeve nava herêma Mîtanî ku lê jiyane.

Li ba Mêraniyan jî sîstema konfedere hebû; her kes di nava êla xwe de serbixwe bû, li derva girêdayî kral/mîrê giştî bûn û herkesî hêza xwe eskerî hebû. Edet û ola wan mîna kalên xwe Gûtiyan bûn.

Padîşahe Asûr Tiglatplaser di pirtûkê xwe de dinivîsîne, ku Urartûyan Nayrî yen girêdayî Mîtaniyan, welatî xwe yî: ji bakûrê çemê Dîclê û Pirat, Xarpût, Dêrsîm-Bedlîs û li başûr direj dibe; ji wir jî beta çiyayê Torosan direj dibû. Ji vê jî ev dertê, ku Urartu dewleteka ji konfederasyona Mîtanî û gelé Arya yê li Araratê pêk dihat?17’ BT di sala 715 an de bakûrê Sûriyê

di destê Mîttaniyan de bû, lê Mîtanî bi êrîsên dawî yên Hîtîtan qels ketin. Mêraniyan ji kesên di ereba hespan yê şer de digorin "Meryannî". Zanyarê Mîtanî yê bi navê Kikkulis li ser giya û hespan têzek amade kir û ev di arşîven Hîtîtan de ye û rastî eve ku ev ji welatê Mîtaniyan (Mêrdîn) ê hatiye. Di salên 1700 an BI de welatê Mêranî di navbera ava Çaxçax (Nisêbîn) û Circipê de bû. Pey Mêraniyan, Nehri mîrnîşîneka din li Araratê sererast kir. Nehrî di 1500 an BI de ji Araratê heya Torosan mîrîtiyek saz kiribûn. Nehrî birreka Sûbarîne û Kurd in. Rojhilatzan Majarson dibêje: Navça Nehriyan ne tenê dora çemê Zê ye. Padîşahe Asûran Tiklat Palazarê yekemîn û neviyên wî dibêjin ku gelé ku li serê kaniyên Dîcle û Firat û bakûrê çiyayê Nîfast (Bedlîs, Amed, Xarpût, Dêrsîm) û çiyrayên Torosan desthilatdarî dikir. Ev welatê Nehriyan e û di hengama Iskenderê mezin de navê Kurdûwan stendibû. Nehrî bapîrên Mad û Kurdên îro ne.(9)

Nivîskarê Tarîxî Umûmî Mûerrixîn dibêje: Di salên 1600 an BI de mîrnîşîna Mîtanî ya jêhatî, şervan û pir xûrt bû. Ji alikî ve rojavayê Kurdistanê

bi giştî; Sûriye, Amûra, Arafa (Enqere, Anatol) û Asor di bin deste Mîtan de bû û ji Mîtan re serê xwe nizm dikirin. Tê fêm kirin ku Mêraniyan xaka Xorriyan bi tevahî kirine bin desthilatdariya xwe. Ew sînî û heykelên li Navenda Anatole derdikevin jî vê didin xuyakirin. Jêderên dîrokî dibêjin ew di dema Kassiyan de dere peş ketin. Sînorên dewletê li destpêkê ji Firat heta Xebûr û Torosan dirêj dibûn. PaşĞ heta Antalya û Iskenderûnê sînorên xwe fireh kirin. Li destpêkê paytextê xwe Riha bû. Dema xwe ya herî bi hêz jî BI 1600 an de bû. Mêranî vê demê li başûre Mezopotamya bi Asûriyan re û li başûr jî bi Misiriyan ve di nava gelek têkîliyên cûda de bûn. Ew têkilî carna wek şeren dijwar, carna wek kirîn û firotin, carna wek mirovatî û gelek cûreyên din de pêk dihatin.

Tekiliyên Misir û gelên Arran bi şer destpê dikin. Misirî, ber bi bakûr derbasî tevgerê bûn; bi Mîtaniyan ve şer kirin û welatê wan talan kirin. Bi ser vê de, demeka heyiyê/dewlemendiyê dest pê kir. Ji ber ku, ji cîranê xwe Asyayî, bi taybetî jî ji dewleta Mîtanî gelek xenîmet digirtin. Ji wan dîl girtin, ^tên şer guhartin û gelek xenîmet jî bi dest xistin; bi vî awayî di welatê Misir de heyiyek çêbû. Bi taybetî jî di dema kral Thutmosis III an (1493-1438) de 17 caran ê^ li dij Kurdan hatin kirin. Wî kralî berê dixwest peravê Derya Spî heyne. Paşd gihîşt Kadeş ê. Di bin serokatiya kesê bi navê Furstenê ji Kadeşâ de îttîfaqek çêbûbû û bi mehan şer kirin. Artöşa îttîfaqê ji xwe şûnde gelek erebeyên şer û çek cîh hîştibûn. Di ârîşa heştan de (1457) artâşa Misir gihîşt Firatê. Di nivîsekê de tê gotin: Sê serokên élan û 30 jinên wan; 80 dîlên şer, 306 kolê, jinên koleyan, zarokên wan û weqas kesên sivîl, zarok û jinên wan jî min dîl girtin..." Di dema Thutmosis IV an de hikumeta Misir ârîşân xwe li dij Asyayî yan dev jê berda. Ji ber ku kralê Mîtanî razi bû ku keçika xwe bide kralê Misir. Lê vê carê jî Hîtîtan dijminatiya Misirê kirin.(ft9)

Di kolînên Amarna yên li Misirê de 350 nameyên dîplomatikê li ser textên ji heriyê hatî çêkirin derketin holê (1887). Evên ba^ş ji alî kralê împaratoriya Mîtanî, Tushratta ve hatibûn nivîsin. Ev piştbazêkî Misiriyan girîngbû. Ji kralê Misir re keçikên xwe tim dişandin. Yek ji wana jî Kija (Kejê) bû ku bi kral Akhenaton (1353-1336) re zewicî û jê lawikek bû. Ji ber ku jina xwe berê Nefertîtî çar keçik anîbûn, qîmeta Kejê zêde bû û jê re şato hate çêkirin. Hinek jêder dinivîsînin ku Nefertîtî Kurd e, lê ew ne di cîh de ye. Ji wan nameyan yekê kralê Mêranî ji dayika Akhenaton Tejê re dinivîsîne û loma jê dike. Di namê de dinivîsîne ku; diyariya ku bavé Akhenaton soz dabû, Akhenaton neşandine. "Min ji mêrê te heykelên ji zêrê safî xwestibûn... Lê niha... Lawikê te (Akhenaton) ji min re darê bi avzêrê şandine. Wextê li welatê lawê te zêr mina xweliyê pir in, ew çima

nade min û pirsgirêkên mezin derdixe? Ev îşareta baweriya wî bi min nayê ye?" Çima ji kral re ne ji dayika wî re nivîsandiye? Belkî Akhenaton bi karên olî re zêde eleqedar dibû û girîngî nedida polîtîka derva yê welat.(70) Bi dîtina min ev sedemeke rast nîne. Iro jî di edetên Kurdan de bav/dayikê lawik muhatap tê girtin. Yanî xezûr rasterast ji zavê ^tên wiha naxwaze. Yekê jî dema keçik danê peyman

(qeling) bi dê û bav re hatibû kirin ku evv berpirsiyarê wî karî ne. Dema ew herdû dewlet bi zêran re mijûl bûn xetera ji bo wan jî li bakûrê welatên wan xwe dida xuyakirin ku ew jî Hatiyên Kurd bûn.

Hatiyan bakûrê Misir û Mîtanî tehdit dikirin. Bi ser vê de Misir arteşa xwe şand lê deren g bû; beta ku herin kurê Tushratta bave xwe kuşt û li cîhê wî rûnişt. Hatiyan di dawî de Mîtanî têk birin. Di arşîva Hatiyan li pay text Hatüşa de nameyek hate ditin, ku ji alî kralîça Misir ve hatibû şandin. Di namê de nivîsiye ku mêrê vvê miriye û ji kralê Hatiyan dixwaze ku evv lawikek xwe ji wê re bişine ku ma ew mecbûrî kesekîbê kok û binât nebe...(7ü,Tê fêhm kirin ku wê demê jî di nava kraltiyan de zewac karê esîlzadan biye. Heta demên dereng axa û mîrên Kurdan jî ew kevneşopiya didomandin; keç û xortên xwe ji malbatên mîr û begên di asta xwe de dizewicandin. Ev hê jî di nav Kurdên li Anatoliy a Navîn de h eye.

Di dema Ramsesê II an de jî (1285) Misiriyan li Kadeşe bi Hatiyan re şer kirin. Di sala 1270 an de Ramses II bi serokê Hatiyan Hattusilis ve peymanek mor kirin. Di peymanê de biryar hat wergirtin ku dîlên hatine girtin bihev werin guhartin. Herdû alî jî ji bidestxistina Sûriyê devberdine û li dij êrîskarên sêyemîn ew îttîfaqê çêbikin. Li ser navê Xvvedayên Hatî û Misirî sond xwarin. Ewên ku peyman xirab bike 1000 carî Xwedê Hatî 1000 carî jî Xwedê Misir bela xwe bide serê wran.(fi9)

Di salên 1300 an de li herêmê çar hêzên mezin hene: Misir, Hatî, Mîtanî û Babîl.(69) Di salên 2000 an BT de welatê Xorriyan Mûsil û Kerkük jî

dikire nava xwe. Di dema Mîtaniyan de (1500) ji Kîlîkya heta Kerkük û Mûsilê dirêj dibû. Navenda dewlete jî Hanigalbat bû; li dora çemê Xabûr. Di dema rêvebiriya Mîtanî de, Anatol û Qudûs jî dikete nava sînorên wan. Lê di sala 1360 an de Mêranî ji ber şere hundur lewaz bû.(69> Tê dîtin ku di serdema Xorrî, Mêranî û Hatiyan de sînorê Kurdistana îro yê ku Kurmanc lê nişтecîh û beşekî Anatole yî mezinî di bin desthiletdariya kalên Kurdan de bûye. Asûr jî wê demê (1550 BI) di bin desthilatdariya Xorrî-Mêraniyan de bûn; tevlîheviya di welatê Mîtanî de Asûran jê îstîfade kirin. Di bin serokatiya Assur Ubalît (1365-1330) serxwebûna xwe ilan kirin, ji ber eriş û talana wan gelé Mîtanî koçê cîhên din

pjn(94-231)

Faik Bûlût ji tabletka Asûriyan ku ji sala 843 an BI mayî de radigihîne ku: Aryan, ji Herat û Meşhede di geliyê Serahs re derbasbûn û hatin wir. Nêzîkî sala 900 an BÎ de vê koçê destpêkirî ye. Pars li peş, Mad jî li paş hatine.(%) Ji wê agahiyê ew tê fêhm kirin, ku Mad û Pars gelé Asya Navîn in. Ez vê dîtine parve nakim, berê jî min got Kurd gelé hîva bi bereket in û piştre çûn Asya Navîn. Salên 900 an jî êdî milêtê Arran xwe li Asya birêxistin kir û ber bi rojava yan jî rojavayê başûr hat. Ew hatin ji neçarî û ji bo tolhildanê bû... Lê dîtina din gelek baikêş e: Aryan, li stebên Rûsya bûn du beş: Hîtît û Xorrî. Hîtîtiyan bi Mîtaniyan ve împaratorî saz kirin, bi hev re jî şer kirin û di dawiyê de wek di kevalên li Boxazkoy hatine dîtin de tê nivîsandin BT di sala 1400 an de

peymanek çêkirin.(36) Ev agahiya ji bo îddea vê pirtûkê gelek hêja yê, lewra Xorriyên li stebên Rusya piştre wek Saka derdikevin peşberî me û bi dîtina min ew sê beş bûn. Wek Kurmanc, dimilî/Kurmanckî û lerî ji hev cûda lê xaka wan cîranê hev bû. Mirov dikare wek Iskît, Saka û Sarmater jî bi nav bike. Iro jî berdewamiye wanê li Navenda Anatolî ye ne. Di beşe Saka de emê dîsa qal bikin.

Dewleta Mêraniyan bi erişen Hîtît/Etiyan û Asûriyan ji hole rabû; kral Salmanasar di sala 1270 an de ew ji holê rakir. Di xirabê Nînova de gelek agahî li ser Kurdan derketin û Henry Layard ji wan heykel, nivîs û wêneyan van agahiyan dide: Wönekeşan li ser keviran, bajarên bi sure nekiş kirine. Ew li keviya çeman tenê tesfîr kirin. Even ku hatine dagirkirin, di nava şaristaniyeka gelek peşketî de bûn. Işareta ve jî meqere (meqereyên girêdanê) li ser deriyên kelehan bi kar dianın û erebên wan ên hespan ên modem û bi çînik (motif) hebûn. Yekê jî di tekerê wan erebena de heşt, yekcaran jî 12 stûn hebûn. Gelek vazo, darên bi nirx, şal, camên bi sûs hebûn. Di nepixandinên axê yen li bajarê Nemrûdê yê herî kevn de, tê dîtin gelé ku hatî dagir kirin xwedî kumên ecêp bûne. Asûriyan kumê xwe li jor gilover bûn. Yên vî gelî mîna kovikan bûn lê ne wek Asûriyan seriyên xwe tûj, hinekê pan û qilot bûn. Wekî xuya dikir, yan ji kulav yan jî ji şerîtûn bi keten hatibûn çêkirin. Botên eceb ên hetanî textikê junî dikirin lingen xwe û pozî cîzmeyî ber bi jor xwar bûn. Iro jî li Iran û Tirkiyê ev bi kar tên. Porê wan direj e, ji paşve girêdanê û şerîtekâ dane ser|h8) dibêje. Wekî tê dîtin ev wênen li ser keviran yên hatinî çêkirin û Layard qala wan dikî de cil û bergên mîna yên Kurdan e. Iro jî ev tiştana hene û ji wan solana re: "Kaloş û Çarix" tê gotin.

GÛTÎ (Kardû, Cudî, Gûtiyûm)

Pewîste zimanzanên Kurd li ser vê peyvê lêkolîneka kûr bikin; lê wekî xuyadike yan jî gor dengê dide, nêzîkî peyva kurdî ye. Eger çar-pênc hezar sal li ber çavan bê girtin mirov dikare bibêje navê Kurdan koka xwe ji peyvê wergirtiye. Lê dîsa jî em vê yekê ji dîrokzan û zimanzanan re bihêlin û binêrin ka li ser Gûtiyan çi hatiye gotin: Tê gotin ku ew peyva di wata leheng (qehreman) û kesên şervan de bikar dihatiye. Birêz Ocalan dibêje: tê mana ga.(72) Eger wiha be, divê girîngî yan jî pîrozbûyina ga di nava vê komê de hebe; yan jî ewana ga xwedî dikirin ku ew nava lê hat dayîn.

Asûr ji bo wan dibêjin: "Cin û ejderhayên çiya." Navkirina Asûriyan hîn mantiqî xuya dike, lewra ew gelé çiyan, şervan û dijminê sereke yê Asûr in û ew nav lêkirin jî xwezayî ye. Prof. Şemsettin Gunaltay dibêje: Ji dema neolîtîk (8000 BÎ) vir ve li Rojhilata Navîn dijîn; ew mirovan taybetmendiyên xwe yên wê demê, ku merd, çipik, bi vîneka bilind û serî xwar nedikiri girtibûn û bajarekî mezinî bi navê Gûtiyûm ava kiribûn. Ew taybetmendiyên tên hejmartin bi zêdehî mirov dikare di nava Kurdan de û di qerektera wan de bibîne.

Serokkomare Tirkiyê yê berê ismet Înonî di dema peymana Lozanê de, li dij têza Îngîlîzan: Ji demeka pir keim vir de, li çiya geleki turanı (di wata tirkan de bi kar tê, lê wê demê Kurd inkar dikirin û hemû Kurd wek Tirk-Tûranî didan nişandan) yê bi navê 'Guduya' rûdiniştin. Geleki pir şervan bûye û naiv xwe tê wata 'şervani;' dema rnirov werdigerine zimanê Asûrî ji ew ıvek "Gardu yan ji Kardû tê xwendin. Peı/va Kurd ji wir te; dibêje. Her çiqas Kurd inkar bikirana ji, ji dîrok û çanda Kurdan agahdar bûne û ew yeka ji bo berjewendiyên xwe bi kar anîne. Eğer cîhê peyva Turan de Kurd bigota her tişte gotibû rast dibû. Prof. Egon Von Eîstedt: "Gelen li Mezopotamya dijîn 3000 sal BJ Kurd û Lor nasdikirin. Gûtî û Lûlû yan ji Gûtîum-Lûlûbium navê gele di newalên Zagrosan de rê nedidayi û li wir bi cih bûyî re dihate gotin. Zimanê Xorriyan mina yê bapirên xwe Gûtiyan bu " dibêje. Di vir de Lûlû û Gûtî cûda tenê bi navkirin û tê tespît kirin ku pêne hezar sal in ew li Zagrosan dijîne. Gelo mirov dikare bibêje Lûlû kalên Lor-Lek ên îro ne? Ihtîmaleke mezine ku wiha ye. Wê çaxê mirov dikare bibêje ku Gûtî kalên Kurdan -ji bilî Loran- yê giştî bûn? Ew cîhe lêkolîneyên kûr e, lê ji bo ku Eîstedt dibêje ew Gûtî bapîrên Xorriyan bûn ew encama jî dikare derkeve.

Lêkolînerê Kurd Izady jî vêîddeayê bi hêztir dike û Gûtiyan wek hemû Kurdan û Sûbarêyan jî wek êleka girêdayî wan nişan dide: Sumerî di

belgeyên xwe de qala êleka Gûtiyan dikin ku ew Subirû-Saubarû (Subarî) bûn. Di dema modem de jî ew Zebarî ne. Zebarî çar hezar sal in hîna jî li heman cîhî dijîn. Li bakûrê Hewlêr, navê kralê Gûtî Tirigan hîn jî tê parastin, ku li bakûrê Zebariyan li ser êla Têrikan ma ye.(154"74) Têrika hîna jî li Anatoliya Navîn, Kurdistan û gelek cîhên din hene. Eger mirov vê belge û ditineyên din jî cîddî bigre, Gûtî yekîtiya Kurdan ya giştî ne. Wê çaxê jî ev pirsa derdikeve holê, gelo wê demê zaraveyên kurdî hîna derneketibûn holê? Gelek dîroknûs îşaret pê dikin Gûtî kalên Kurdan yên bi giştî ne. Yek ji wana Torî ye û dibêje: Sumeriyan, Gûtî wek şeytaneyen çiyayî yên bawerî bi agir dianî didan nişandan. Wê demê Gûtiyan di perestgehan de agirê mezin vêdixistin û baweriyê bi Xwedê anîne. Tiştekî din ê tê zanîn jî ew e; ku berî Sumeriyan jî gel li vir dijîne. Ji dema wan de jî belgeyên bi wêneyên keştî û miyê hatine dîtin.(6) Yê din R. Blaga ye ku hîn ba^ştir dike: Gûtî navê gelé 3000-2000 sal BI li Ezerbeycan û Kurdistanê jiyaye. Yekê jî sala 1000 an BÎ de ji Ûrartû, Mana û Medan giştikan re digotin Gûtî.(95~73) Bi taybetî jî hevoka dawî zêde baweriyê dide, ku mirov wana wek kalê hemû Kurdan bibîne. Dîrokzan bi piranî ârîşûn Gûtiyan ên ser Asûr, ji rojhilat û navenda Zagrosan nîşan didin û ti qala Ezerbeycan nakin. Eger ew dîtin rast be, tê wê watê ku Kurd wê çaxê bi navekî dihatin nasîn.

Dîsa îddeaka pir zelal ji alî Torî ve tê kirin ku dibêje: Li coğrafya Kurdistana îro de gelé herî kevn ê tê zanîn Gûtî ne (wek Kûtî jî tê nivîsîn, BI 4000), ev ji alî gelek dîrokzan û arkeologan ve tê pejirandin. Ji Gûtiyan bi şunda jî bi dor Xorrî (BÎ 4000-1200), Mîtanî, Nehri (BÎ 1500-612), Kassî, Urartû û Med tên. Zimanê Gûtiyan bi yê Xorriyan va yek bû.(3S) Ji alî ziman û çandî ve jî nêzîk bûn û yekbûna wan, van îddeayan jî bi hêztir dike. Heta gor şertön demê û

bi hezaran salan ew qetî jî dibe. Bi qasî min dîtî, li ser kevnbûna Gûtiyan di nava dîrokzanan de lihevhatinek nine û ew piranî li başûre welatê me xuya dikin. Xorriyan jî giraniya xwe li bakûr e. Iro çawa giraniya Kurmancan li bakûr; Soran, Hewreman, Goran û Lor jî li başûr in, wê demê jî Gûtî li başûr, Xorrî jî bi giranî li bakûr xuya dikin. Lê Torî dibêje: nayê zanîn ku kengî ew hatin başûre Gola Urmiyê bi cîh bûn. Di belgeyên Asûr yen dema kral Asûr II an de xuya dike; ku li rojavayê welatê Med, ji çiyayên Şahberdî-Kafelan Kuh destpê dike heta rêzeçiyayên Alwand dijîn. Xelkê Zagrosan heri kevn e û ji alî hemû dîrokzanan ve wek kalên Kurdan tên qebûl kirin. Nivîsa mixan û zimanê Xorrî bikar dianîn. Pir şervan bûne.(94102) Ji nivîskar û dîrokzanên cûda taybetmendiyên Gûtiyan jî derdikevin hole, ku ya herî hevbeş şervaniya wan e, li çiya jiyane, gelên doré jê ditirsiyane û bi Xorriyan ve tekiliya wan ê dîrokî û çandî heye. Prof. Şemsî Gunay ji bo Gûtiyan dibêje: Ew berî seramîkê derbasî bi cîhbûnê bûn, çandinî û ajal kedî kirin. Gelekî biezamet, çipik, merd ji çaxa neolitik bi vîneka bilimi û serî xwar nedikirine. Mîtanî jî berdewamiya İOÎ gelî ne. Kralê Asûr Salmanassar I an (1280-1261) ji bo Gûtiyan (li hinek belgeyan jî Qûtî ha tiye nivîsîn) wiha nivîsiye: Wekî stêrkên li ezman, hejmara xwe ne diyar, di xerakirinê de pispor, li dijî min raperîn kirine û dijminatî avakirine. Di kevirekî din de jî: Ji sînorên Uratrî heta sînorên Kummuhî min xwîna tabûrên artê§a Gûtî mîna avê velokir (rijand).<94U5) Ji vê tabletê xuya dike ku ew gela vê serdemê heta Ararat belav dibûye. Di vê yekê de bandora Asûran û ê^ên wan ji başûr de jî hene, lê eşkere dibe ku Asûriyan bo hemû Kurdan ew navî bikar tanîne... Yekê jî gelé vê demê li Kurdistanê dijî, guman tê de nîne ku çû serê çiyan û navenda Xorasanê...

Wekî ku tê îddea kirin, eger Gûtî gelé herêmê yê herî kevn e, pi rsa, gelo wana ti dewlet û mîrîtî avakiribûn û rewşa dinyayê ya wê demê çi bû? tê

bîra mirov. Tê gotin ku li destpêka 3000 salan Bl de êlên Samî ber bi rojavayê Firat kom bi kom hatin. Hinek dîtin jî dibêjin ew 4000 sal in. Hinek Samî wek karker û leşker ketin nava bajarên Sumerî-Kengiyan. Pa§ê kar û cîhê Kengiyan ji dest girtin û ji sala 2750 BI vir de jî Mezopotamya kirin bin kontrola xwe. Kralê şer Sargon û kralê çar demsalan jî Naram-Sin bû. Kurdan BI di sala 2600 an de di rêbertiya kralê xwe yê bi navê Kamassî de, li Zagrosan dewleta xwe ya yekemîn avakirine. 200 sal ji vê bi şûnde Ereban dewleta Akad ava kirin. Gûtiyan di sala 2233 an de ew dewleta rûxandin û bûn desthilatdarê herêmê. Dewleta Gûtî jî ji alî kralê Ûr, Tîrîgan ve di sala 2120 an BÎ de hat xelandin.<52)

Gelên li Zagrosayên yen bi navên Lûlû û Gûtî, tirsa herî mezin a Akadiyan bûn. Kralê Akad prensê Gûtî yê bi navê Şarlak (Şerwan) dîl girt, dîsa jî êrî§ên Gûtiyan berdewam kirin. 2500 salan BI (hinek jî dibêjin 2233 an-59) Gûtiyan (Kutetî-Kurtetî) dawî li rêvebiriya Akad anîn. Gor belgeyan Gûtiyan paytextê wan Kurtiyûm bû û paşê hatin Arafa (Kerkük). Kralê wan jî navên Arî li xwe dabûn. Wek: Lasîrab, Basiûm, Enrîdûpîzîr, Saratîgubisin, Tîrîgan. 2368 sal BI de Gûtiyan desthilatdarî dîsa wenda kirin; kral Tîrîgan dîl ket û

dîsa helkiştin çiya.(87"79) Dîtin hene, ku dibêjin gelé Samî yen ku çûn û li dervayê bajarên Gûtî-Kurdan bicîh bûn; bi roj çûne li nav bajaran kar dikirine, êvaran jî derdiketine dervayê bajêr. Piştî demekê bi zewacan û tevlihevbûnê ji wan Asûrî hatin meydane...

Salên di navbera 2123-2113 an BÎ de, ji bajarê Ûr, kral Ûtkhegal dikeve ser şopa gelé çiya (Gûtî) û nêçîra wan dike. Piştî vê erîşö, bakûrê dewleta Akad ya ketî desten Gûtiyan rizgar dike. Di dû wî kralî de Ûr-Nammû û yen ji wî şûnde jî heta salên 2004 an BI de ârîşî Elam an kirin û di dawiyê de şer wenda kirin.(A6) Di sala 2120 an BI de, Ûr an dewleta Gûtî ji holê

rakirin. Bi ser vê de Gûtiyan, di bin serokatiya Tigran de li Zagrosan dewleta bi navê Anzan (Xêza) avakirin. Heta dema Medan vana îdara xwe berdewam kirin. Kralê Gûtiyan yê yekemîn tê zanîn Emnatûm e. Even din yên tên zanîn jî: Urbaba, Gudea, Ûrnûngirsû, Sulme, Halbûm û gelekên din in..

Di kevneşopiya Gûtiyan de her êlekê kralêkî xwe hebû û ji nava wan kralana jî kralê giştî dihate hilbijartin. Dema xwe sê sal bûn. Ew sîstema heta derengî di nava Kurdan, Kurdên dervayê welat û bi taybet jî di nava Reşiyan de hebû. Di nava Gûtiyan de êleka bi navê Kaûrhî jî hebû ku îro gelek zana dibêjine ew peyvana wek hev in. Gûtiyan nivîsa bizmaran di salên 3000 an de bi kar dianîn û tê gotin ku bi Sumeran ve tevhev dîtine. Di kitêbên Sumeran de ji bo welatê Gûtiyan "Welatê Iblîsan" têye bi kar anîn.<59) Gor belgevên Akadî, Gûtiyan 2300 an BI de çend caran ûrîşî rojhilatê Firatê kirine û di heman demê de ji avabûna dewletên din re bûne asteng. Di dema Sargon de jî ûrîşî Akad kirine lê bi serneketine. Di 2300 an BI de ûrîşû Tûr Abîdîn dikin û dagir dikin. Di dema kralê Lûlû yê bi navê Elûlûmes de dewleta Akad ji holê rakirin û Kerkük kirin navenda xwe. Kralê Akad-Ûr III Sû sîn (1972-1964) ârîşî Xorriyên li Zagrosan dike û gelek dîl tîne dor bajarê Nippûr û pê dîwarên qelê çêdike. Di dema kralê Gûtî Tîrîgan li Babîl dewlet lawaz ket. Di şerekî de serê kralê Gûtî jêkirin û gel mecbûr bû ku here çiya.(94128) Gûtî vekişîn çiya bi şûnde, vê carê jî rastê êrîşên cîranê xwe yên rojava Asûriyan hatin. Salmanassarê III an (1263-1234) di êrişekê de Gûtî belav kirin. Heta herêma Tor xwîna Gûtiyan rijî. Dîsa kral Tîglathpîleser I an (1114-1076) li Azû (Sason) Gûtî têk birin û bi ser vê yekê de Gûtî vekişiyan rojhilatê Dîclê û êdî bêdeng bûn.(94132) Ji wan bûyeran tê fêhm kirin, ku şerû gelên cîran bi sedsalan ajotiye û herdû aliyan jî di dema dirêj de wenda kirine û bûye sedêm ku

herdû gel jî bi hezaran salan êdî pişta xwe rast nekin. Ev şerûn ku tenê zanîn, lê yên nayêne zanîn?!

HATÎ (HÎTÎT)

îlme modem ew wek Hîtît bi navkirine, lê di esil de ew nava ji gotina Hatî ya berê li vê coğrafya jiyaye hatiye derxistin.(8ü) Hatî, peyveka kurdî ye ku ji hatine tê. Dîrokzan dibêjin gelé nişteciîh ew nava li Hatiyan daniye; ji wê ev encama derkeve; ku gelên berî wan jî Kurd bûn ku peyva Hatî ya kurdî lênan.

Yanê ew piştre hatine. Lê ew navê wanî esası çi bû? Ihtîmaleka pir mezine ku navê êl û federasyona élan bûn, lê bi giştî bi navê Hatî derbasî dîrokê bûn. 2000 sal BI xwe avêtin nava Anatolî ye û li destpêkê xwe li başûre rojhilatê Anatole xwe bi war kirin. Zimanê wanî ji grûpa Hînt-Ewrûpa û diyalekta kevna teyî nasîn bû. Paytext Hatûşaş (Boxazkoy) e ku dora sala 1650 an BÎ de derket holê.(h6)

Hatûşa

Li ser hatina wan ê Anatolê jî dîtinen cûda hene. Hinek dibêjin 1800 û hinek jî dibêjin 1500 an de,(7I) lê li ser ji bakûr ve hatina wan hemû yek deng in. Yanê ew ji Qefqasya ve berjêr daketine. Lêkolînên etîmolojîk didin xuyakirin ku Hatî beşekî mezin ê Aryan e. Wata navê wan jî ewên hatî ne. Li keviya Ki- zilirmak bajar dewletên mîna: Kuşar (Alîşar), Hatûşa (Boxozkoy), Neşa-Kanîş (Kultepe) û Zalpa di bin sîwana Hatiyan de kom kirin û dewlet ava kirin. Li ser kevirekî, kral Anîta tekoşîna xwe ya li hember cîranan qal dike, xwe vvek Hatî d ide nasîn û dibêje zimanê min jî ê bajarî Neşa ye.<87 86) Wekî tê gotin ew li Anatolê bi cîh dibin û şaristaniyeka mezin bi pâş dixin, Imperetoriyeka mezin ava dikin û bi şervaniya xwe deng didin.

Di pirtûkên dibistanên Tirkiyê de tê gotin ku Hatî sê hezar sal BI li Ana¬tolê bûn. Ew bi jêderên din ve hevdû nagre. Nûserên Tirk Hatiyan bi Hîtîtan vê ji hev cûda hesap dikin. Wek berê jî min gotî berî Hatiyan jî Kurd li Anatolê hebûn. Dibe ku nûserên Tirk vana beşekî ji Gûtî û Xorriyan dibînin, ji bo wê vê dîrokê didine. Di lêkolînê hatî kirin de derket holê, ku Anatol berî dîrokê jî xwedî şaristaniyeka pâşketî bû. Ewya jî Hatiyan avakiribû. Hatiyan 3000 sal BI di Anatolê de yekîtiya siyasî çêkirin û ji Hîtîtan re bûn pê§eng. Di dema Hatiyan de xanî ji kerpîçan û hîmê wan li ser keviran bû. Hîtît ji Qefqasan, li destpêka 2000 sal an BÎ de hatin Anatolê; ew êdî îspat bûye.,I48‘31) Di vir de nivîskar Hatiyan wek gelé nişteclh dibîne, yen din ê hatinî jî wek Hîtît bi nav dike. Lê bi dîtina min gelé berê li wir navê xwe ne Hatî ye; dîtin hene ku wek Haldî jî didin, divê navekî wanî giştî yan jî navên élan hebin. Lê ya rast, gelé bere li vir bicîh bûyî, bi yên nû hatirê gotin Hatî. Navê yên kevn pêwîste hîn zêde were lêkolînkirin.

A

Şerif Firat, tekiliya Kurd û Hîtîtan wiha dinivîsîne: 50 sal BI, kalên Zaza-Dumbelî yen îro yanê Tirkên Part, ji alî Belh û Bexterêyan hafin Iranê; hinek Zaza jî Tirkên Etî ne ku li sînorê Iranê derketine.(127'6) Wek tê zanîn Tirk ji bo Hîtîtan dibêjin Etî, ji bo çi vî navî lê dikin nizanim; Mümküne ji daxwaza ku wana wek Tirk nîşan bidin derketibe holê ku vê yeke jî tînin ziman. Çima dibêje hinek? Dibe ku Dimilî axêf jî di nava vê konfederasyonê de bûn. Hema nivîskar rastiyeka din tîne ziman: Zaza, ji ber dagirkirina Ereban ji Iranê der- ketin û çûn çiyayên bilind yen rojhilat. Heta ji şaristaniye derketin û çûn deren bê deng.(127'n)

Hatûşa- Deriyê Şêran

Du alfabebikardianîn;yekamixan, yekjîa hiyeroglîfbû.Ji Mezopotamya destnivîsa mixan anîbûn û nivîsên dirêj û tabloyên heriyê bi vê

dinivîsandin.(8ü> Di vir de biiêz Çix, Hatî û Hîtîtan cûda dide xuyakirin. Lê xeleka girîng ew e ku tespîta "ji Mezopotamya hatin" e. Ew çima ji Mezopotamya hatibûn? Sedema vê yekê gelo xwezayî bû, êrî§ên Ereb û Asûriyan bûn? Tekiliya hatina Hatiyan ê Anatolê û wendabûna Sumeriyan ji dîrokê çi ye? Ev pirsan li bersivên zanistî diğerine... Di pirtûkxana li Hatuşaş de nivîsên bi heşt zimanan derketin. Bi zimanên mîna; Hîtît, Hatî, Xorri, zimanê Iranî ya kevn, Palaiska (Hînt-Ewrûpa û di dema merasîmen ji bo Xwedêyê bi navê Zîparva de dihatiye bi kar anîn.), Lûwiska (diyalekta Hint-Ewrûpa), Sumerî, Akadî ye.(8ü) Ji van zimanên derketî jî xuya dike ku Hatî navendeka girîng bûye. Name û nivîsên ji her deverî hatine arşîv kirin. Hatî, zimanekî Asyayî û ji Hîtîtî cûda bû.,s0) Ew tespîta çiqas raste

nayê zanîn; lê encama ji vê derdikeve ewe ku du netew, yan jî du zarava axifê (wek kurmancî û kirmanckî) cûda nê. Bi dîtina van Hatî miletê berê li vir bi cîh e, zimanê wan jî Asyayî ye, tê vê watê ku ne Kurd in. Ez vê dîtine rast nabînim, lewra gelek îşaret hene ku ew Kurd in. Wekî me got vana navê Hatî li yên nû hatî kirin ku ew jî îspateke ku Kurd in. Ji alî cil-berg û olî de jî îspat hene. Destnivîsa hiyeroglîf ê bi zimanê Lûwiyan bû; bi zimanê Hîtît ve ji heman kokî ye, lê hinekî cûda ye. Tabletên ber çavên gelé hemû bi vî zimanî ne; di vê yekê re te xuyakirin ku xelk vê ziman û nivîsê jî dizaniye. Di vir de ev pirsa tê bîra mirov: Gelo Lûwiyan berê destnivîsa hiyeroglîf bi kar tanîn û evên îdara welat kirinî dest xwe pa§ê dest bi nivîsa mixan kirin?(80)

Lûwî, wek tê zanîn netewê Anatolê yê herî kevn e. Çawa zimanê wan bi)ê Hîttîtan ve ji kokekî dibe? Di vir de jî nakokiyek heye. Dibe ku Lûwî beşek ji Kurdên nîştecîh, Hîttît jî yên koçber bin.

Birêz Ocalan dibêje: Ew di

destpêkê de mîna konfederasyona élan bûn, paşâ bû navendî û koledar. Wekî di babetê din de jî me gotî, bi piranî sîstema rêvebiriya Xorrî, Mîtanî, Hatî û vên din sîstemeka élan in. Ew yan wek

J J

federasyon yan jî wek konfederasyonan; gor rewşa rojê û dijminatiyê ew dibûne hêzên mezin; împeratorî û koledar. Ji bo ku Hatiyan hesin bi kar tanîn, di heman demê de bi Asûr, Misir û Babîl re şer dikirin. Di sala 1595 an BI de Babîl dagir kirin. Kral Şuppilûliuma (di wata av- kanî ya pak) di sala 1380 an de bû kral. Ji bo ku erdê xwe fireh bike ûrîşî kraltiyên bajarên dor xwe kir, her der xirawe kir, şewitand û 3300 dîl ji wan deran anîn. Nêzîkî Misirê bû û Misirî gelek tirsîn. Kralê Misir Tutenkamon miribû, jina wî ji krale Hîtît lawikekî dixwaze, lê li sînor ew tê kuştin û bi ser vê de, 70 salî şer di navbera wan de derdikeve.(69)

Şuppilûliuma gelek caran ârîşî Mîtaniyan dikir. Ji ber vê yekê kral Sutarna nêzîkî Misiriyan bû û keçika xwe bi navê Gilûkhipa (Gulpêrî?) de Amenophisê III emîn. Kralê Kassiyan Kadashman-Enlil jî xwîşka xwe dayê û di nameyeke de tê fêhm kirin ku ew ji bo xwîşka xwe di nava fikaran de ye. Şuppilûliuma keçika xwe jî dide kralê Hayaşa yê li rojhilatê Anatolî ye, kral Hukkanaş. Hema kral keçika xwe ya bi navê Muvattîş dide mîrê welatê Mîran yê bi navê Mûşhuîlûvaş. Yekê jî dide kurê kralê Mîtanî Maddîvatza û dibêje keçika min meke dereca diduyan û ewê bibe kralîçe.(80) Bi Misiriyan ve di sala 1285 an BI de li Kadeşû şer kirin û Sûriyê di nava xwe de kirin du

par. Bajare rojavaye Anatoli ye Troya ket desten "Qewmen Deryaye ' bi şunde

dema Iyombune destpe dike. Ew yeka heta Mezopotamya u rojhilate Derya

Spi berdewam kir..

-1200 BÏ

n Mezm

Engûrï

ASUWA

ARZAWj

LUKK.A

1649

Tyrus

ARAMI

1400

Be avbuna Hitit u Hezen Mezin

Di dema xwe ya hen bi hez de, tevahiya Anatole kontrol dikirin, tişte

balkeş ewe ku h dora Çukurove u rojavaye Kurdıstane ji bajar dewleten otonom

nene. Tişte din e balkeş jı ev 12 dewlet in.

1- Tabal: Qeysen, Nixde u Qereman

Melitene: Meletı, Elbistan, Samsat

Kummush: Semsur

4- Gurgum: Mereş

Qeretepe

Adana

Sakçagozu

8- Sam al: Osmaniye

KarkHemush: Dilok

10- Til Barsip

11- Arpan: Reyhanli

12- Ungî Patin: Hatay(66)

Di sîstema rêvebiriya Kurdên Anatole û Kürden li dervayê welat ê kevn de hejmara 12 bi kurahî cîh digre, kes bersivê nade sedema vê çi ye. Li vir jî 12 derketin hemberî me, tekiliya vê û wê heye? Dikare bibe, ew hêza wan élan di nava Imparatoriyeke de jî mumkune ku rola xwe bilîze û di bajar dewletê xwe de otonom bijî. Di navbera salên 1700-1200 an de wek dendike Xorrî û Mîtanî; di dema Asûr de, 1000-700 an BT de jî wek bajardewletên serbixwe xuya dikin. Ihtîmaleke ku ew Kurdên îro yên li dervayê welat in.

Di belgeyên Kultepe yên ji BI 1900 an de mane, ji bo Hîtîtan, peyva Hatî ye bikar te. Hatî ji dewletên bajaran pêk dihat û hertim bi hevre şer dikirin. Xwedêyê xwe yê herî mezin "Arînna" (navê bajar e û Xwedayê wî bajarê rojê jî Arîna ye- 87) yanê, dayika-rojê bû.

ew pêk anîbû... Heykele li nava Enqereyê ku rojê tesfîr dike ji Hatiyan ma ye û çanda Kurdan ya olî nişan dide; lê Tirk lê xwedî derdikevin..,! Yekê jî ew bi yen Saka û yen li Kütahya derketî ve gelek dişibin hevdû.

Sembola Rojê

Xwedêyên ku dihatine pîrozkirin yan jî jê re îbadet dihate kirin 63 bûn, ku di lîsta derketî de navên wan heb Cm. Yê sereke Teşupe ye ku Xwedayê ba- hozê bû; jina wî Hepa bû. Canegê bi navên Xorrî û Şerî yê ku erebeya

Hepa dikşandinî jî hürmet didîtin.,87/94) Di nava gelên Arran û Hatî de cejna biharê "Purullî" dihate pîroz kirin. Vê cejnê; tekoşîna temsîldarê zivistan marê bi navê "Illûyanka" û Xwedayê ezman "Teşûp" sîmge dikir. Yezdan mar dikuşt û heyî/bereket dibû.(R7) Di vê kevneşopiye de mar temsîla serma û tuneyî yê dike, le di kevneşopiya Ezdiyan de (ya me kevn jî) jî temsîla heyî yê dike. Divê têkiliyek yan jî bingehekî wan ê civakî ya hevbeş hebe...

Li dérivé Yazilikaya, perestgeha Hîtîtan heye, ku li dîwar dozde (12) Xwedêyên dar di dest de ye hene. Vana wek hev in, yezdanê çi ne, navên wan çi ne nayê zanîn. Lê divê hejmara dozde (12) girîng be; piştre ev\ê Anatole bawerî bi 12 Xwedayên Olympos (navê xwe Hera) bîne; îsa ewê bi 12 hawariyên xwe ola xwe belav bike; 12 îmam cîhekî gelek girîng digrin...(119'30)

Hejmara êlên Reşiya yên li Anatolê jî hemû 12 ne. Lê wexta hemû Reşİyan bidî ber çavan ew hejmara élan digihîje 70-80 élan. Divê tekiliya van 12 an, yan rasterast an jî endîrekt bi hev re hebe. Ew jî tekiliya Hatî û bi taybet jî Kurdên li Anatolê derdixe holê. Dibe ku ji hinekan re zêde xeyalî be, lê wiha

ye: Çavderek, lekolınerek, oldarak û civaknasekî baş dikare vê têkiliyê îspat

bike. Lewra di nava Kurden li Anatoliya Navîn de û di praktîka wan de agir

pıroz e, le ew mısılman u bi piranı Henıfı ne... Kes nikare bersiva ve nakokiye

bide?! El hertim 12 ne, lê kes bersiva vê nikare bide... Di civaka Hatiyan de

kral temsildarê Xvvedê nînbû û biryar ji alî civakeka ku ji wê re "Panku" dihate

gotin ve dihatin wergirtin. Iro jı Kurd ji ve re dibêjin Pergar yan jî rûspî.

Gırıng e ku Hatiyan kral pıroz nedıtine u ew wek revebir dihatiye ditin. Li nav

Kurdan u bi tay beti li nav Kurden li Anatole jî, koma rûspiyan heta demen

dawı (dema koçberiye de) kar dikir le bi hatina Komara Tirk re ew ji hole

radibe. Ew jı bi sere xwe ıspatek e. Ji kıjan alı ve dibe bila bibe mînaka bi vî

rengi gelek in u ew encam derdikeve hole: Wan Kürdana, ew kevneşopiyen bi

hezaran salan ji kalen xwe u di praktîkê de girtine û di bin mêjiyê wan de cîh

gırtiye; piştre bi zore oie wan u rewşa wan hate guhartin, lê kevneşopi\£n berê

he jı şopa xwe didin dom kirin.

12 Xwedayen Hatiyan yen bi çek li Yazilikaya-texmini 1250 sal BI

Di ah civakı de kevneşopı wiha bune: Li cem Hatiyan 18 cejn hebûne,

cejn ev bune: Oroqe, xermana, bax xelandin, miroven kal, xanî çêkirin, ejderha

kuştin, miroven li dur, seri şuştine u birina çihê razanê, li ber gerandinê û hwd

bune. Hinek ji van e yen gelen berê li vê herêmê bûne û hinek jî ji yê Xorriyên

di heman deme de jiyayi mane.(80) Iro ji ew cejnana di forma rojên taybet de

bi gişti nebe ji, li hinek hereman u di nav gelên li Anatolê de pêk tên. Hîna jî

li Anatole dibejin "Serê xermanê" ku koka xwe ji wir digire. Wekî din jî dema

beran berdane, dema bax xelandine û xam çêkirine de jî bi forma cejnê yan

ek rojeka taybet, yan ji ji rojên din cûdatir tê peşwazî kirin. Têkilî di ali

kincan de ji xwe dide îspatkirin:

Gor M. Çix dinivisîne kincên Xwedayên Hîtîtan wiha bûne: Blûzekî mil dirêj, di bin de jî fîstanêkî bi çirtik, li navê pişt, li serî tiştekî mîna fesan lê ji wan dirêjtir û hemûyan jî guharê xwe hebûne. Mêran jî di ser de îşlik, şalekî hetanî çokan û solên poz xwar.(80) Kincên jinan, bi taybetî jî tasê/kofiyê li serî û solên ku em "çarix-keloş" dibêjin gelek nêzîkî yen Kurdên li dervayê welat in. Bi taybetî jî serpêçana jinan û keloşen di lingên mêran de heta demên dawî jî li Anatola Navîn û Xorasan bi kar dihatin. Bavé min digot: Berê mêrên Kurd jî guharê dikirine guhên xwe.

Hatiyan dema xanî yan jî qesr çêdikirine cejn dikirine û taximê xaniyan tiştûn mîna: Zêr, zîv, sifir dikirine. Dema davêtine jî wana gotiye: Ev maden çiqasî saxlem in xerê, xanî jî weng saxlem bibe. Wekî din jî rûn, hingiv, xwê û meywe jî dikirinê ku ma bereket bibe. Ji ber ku paşnav tunebûne, mirov bi navê bavé dihatine bi lêv kirin. Hîtîtan ji bo nexweşiyan giya bi kar dianîne û ji bo baran bibare jî dawetê dikirin, di dawetê de wanî xwe tazî dikiriye.(80) Çiqas balkûşe ku hîna jî ew kevneşopiyana li Anatola Navîn bi kar tên. Wextê xanî çêkirine, em tiştan davêjin texim û wextê dîwar bilind bû jî mirov qurban li ser serjêdikin. Bi navê bavé bi lêv kirin hîna jî di nava Kurdan de bikar tê. Ji bo nexweşiyan giya bi kar anîn heta demên dereng jî bikar dihatin; bi hezaran derman

çêdikirin, lê mixabin piranî wenda bûn. Min hinek di kovara Avaşîn-9 an de komkirin lê pir hindik in. Ji bo ku baran bibare, gelé me berê hildikişt serî çiyan û qurban serjêdikirin. Hilkiştina çiya jî balkeşe ku ji baweriya kevn a Su merî û Xorriyan tê. Li Xorasan jî ew bi kar tê. Wekî din jî dema hişkî yè, zarokan bûka baranê çêdikirin û li ber malan diğerin. Wextê diçûn ber malê, xwediyê malê av davêt ser bûkê û xwarin dida zarokan...

Di tespîtkirina gelan de wasita herî girîng ziman e. Zimanê Hatiyan çawa bû? Gor zanvaran: Zimanê Hatî bi zimanê Lûwî û Pala ve ji malbatek bûn. Ji komên netewên dinê tevhev dijiyanî peyvan heynan û di guhartineyên etîmolojîk re derbas bûn. Zarava Kurmancî, guhartina cîh û dema etîmolojîka wî zimanî ye:

Şivvat Nîda

Şe Zari Mane'ra

Harı (Xorrî-Haldî)

Harı (Xorrî-Haldê)

Ebanî (Xorrî-Haldî)

Sale (Xorrî-Haldî)

Pir balkeşe ku 4000-5000 sal in ew zimana hîna jî vvek hev e ku ew jî, xurtbûn û kûrbûna çand û şaristaniya Kurdan derdixe holê. Ew jî îspateke Kurd û Hatî-Xorrî-Mîtanî miletek e. Ji bo miletê Hatî, ewên berê li wê axê bi cîh bûnî navê Hatî lêkirine, ew jî îspata gelé berê li wir nişteçîh jî Kurd bûne derdixe holê. Mirov dikare bi rêya etîmolojiya peyvên Hatî, yekîtiya nijadî û zimanê Hatî û Kurdên îro bide îspatkirin.<87)

Di dema Imparatoriyê de kilameka eskeran wiha bû:

Kincin Neşaş kincin Neşaş

Tene ji min re tene

Û yi min ji diya min Uıvaş re bibine

Teni ji min re tene

U ye min ji diya min Uzvaş re bibine

Teni ji min re tene

Tene ji min re tene (Sîraç)

Wiha tê fêm kirin, ku Xorrî, Hatî, Mîtanî û Lûwiyên li başûre rojavayê Anatoliyê xwedî çand û zimanekî hevbeş in. Ew gelana bi Kurdan ve di her alî de wek hev in. Mirov dikare bibêje, heta huciêyan wek hev derdikeve holê ku di dîroka ti miletên din de îspata wiha nîn in.

Kralê Hatî Şuppîlûlîuma di destpêka demsala 1400 an Bİ de ji bajarê Kargamiş, ji bo avakirina qesrê 3300 kes anîn Hatuşaş. Subay û eskerên anîn jî dervayê wî hesabî ne. Kurê wî Murşîlî 11 an jî ji çiyayê Arînan de 15 500 kes gor belgeyeka din jî 66 000 kesan anîn.*87' ,83) Ew cîh guhartina navxweyî jî dikare di koçberiya Kurdan de rolek lîstibe.

Di alî şoreşa teknîkî de jî Hîtît gelek pdşketîbûn. Hertim diyariyên ji hesinan çêkirî ji kralê derve re dişandin. Bi taybetî jî bi çêkirina erebên şer, ji alî şer de ew pir pöşketin û wek bayekî di ser Mezopotamya re derbas bûn.

Di heman demê de Misir ji alî kralên Kenanan û Xorriyan ve hate dagirkirin û vana jî erebeyên xwe yên şer hebûn.(69) Bi dîtina erebeyên şer bê guman Hati- yan peşketineke mezin derxistin holê Ci Imparatoriya xwe fireh kirin.

Tê gotin Misir bi dewletên mîna xwe bi hêz re şer kir û beşek ji şaristaniya xwe, jî miletên kirî bin destên xwe girt. Ji wan welatên rojavayê Asya xelatên mîna qumasên bi qelîte, vazo, erebeyên şer û hacetên rojana dihatin.(68) Bi taybet jî cîranên Misirê, yen li bakûr û rojhilat mîna Kurdan

û Asûriyan li ser çanda Misir bandorek çêkirine. Yanî dema qala şaristaniya Misir tê kirin bê zanîn ku ew koka xwe ji cîranan jî digire.

Di dîrokê de kralên Hatiyan yên ku tên nasîn ev in:

Dema Hîtîta Kevn:

1650-1620 T.Hatûşîlî (=Labarna) û Kadduşî

1620-1590 T. Murşîlîn û Kalî (Babîl 1594 zept kirin)

I. Hantîlî û Harapşîlî I. Zîdanta

I. Huzziya

1525-1500 Telepînu û îştapariya

1500 Tahurvaîlî

Allûvamna û Harapşekî

II. Hantîlî

II. Zîdanta û lyaya II. Huzziya û Şummîrî I, Muvattallî

Dema împaratoriyê:

1450-1429 II./I. Tuthaliya û Nîkkalmatî

1420-1400 I. Arnuvanda û Aşmunîkkal

1400-1380 IIT./II. Tuthaliya û Taduhepa

1380-1345 I. Şuppîlûlîuma û Hentî, Ta vanna (=Malnîgal)

1345-1343 II. Arnuvanda

1343-1310 I. Murşîlî û Gaşûlaviya, Danûhepa

1310-1282 II. Muvattallî (Şeıe Kadeş-1285)

1282-1275 III. Murşîlî

1282-1276 III. Hatûşîlî û Puduhepa (Peymana Kadeş-1270)

1250-1220 IV. Tuthaliya

1220-1215 Kûrûnta (=Ulmîteşup)

1215-1210 III. Arnuvanda

1210-1200 II. Şuppîlûlima.<sn)

Hatiyan împaratoriyeka fireh, peşketî û dewlemend avakirin. Ew dewlemendî bû hedefa örîşân gelên jj derva yên birçî û dijminên Hatiyan yê bi sedan salan Asûr û Ereban. Hatiyen xwedî şaristaniyeka kur û fireh, di sala 1200 an BI de ji alî gelên ji deryayên Spî û Ege hatinî ve hafin ruxandin! Ew

kî bûn? Xelkên li Derya Spî û Ege dijîn bûn. Xelkê cüda cüda bûn, lê wek Moxolan bûn; pir şervan, pir pît diketin tevgerê; xwînmij bûn. Li ser belavbûna wan di berhema bi navê "Historien Med Nya Ogon" de wiha tê nivîsandin: Vana çima malên xwe d hîştin? Pirbûna nifûsê hatina wan kêm kir; demeke dirêj hewa xirav çû û hilberîna wan xerav bû; serokên wan ketin dû talanê ku arteşa xwe bihev bigrin, xwedî bikin û cîranên xwe bişelînin. Bi taybetî jî li şeıe Hatiyan gelek jin û zarokên kuştî li dû xwe hîştin ku xelk lê eceb mayî dima. Kralê Hatiyan nameyeke ji cîranê xwe re dişîne û tê de dibêje: "Me hê ti işaret ji gelé gola nedîtiye (hîn ûrîş nekirine-ş) û namê (kiremit) dike firinê ku bişîne; hin di wê merhelê de tenûgihîştiye, ku ew gelé hov hatiye û welatê wî rûxandiye. Ew name sê hezar sal şûnde derdikeve holê. Belê, hovîtiya wan ji zarok û jinên li dû xwe kuştî hiştî xuya dike. Xuya ye, ku di şeren bê xeber û nişkeve de serkeftîbûne û bê tedbîrbûna Hatiyan jî bû sedema hihveşandina wê Imparatoriyê.

Hinek Hatî vekişiyan rojhilatê başûre Anatol û dewletên bajarî yên mina Meletî, Mereş, Zincirli, Sakçagozu, Kargamiş avakirin. Vana jî, dawiya sala 700 an Bİ ji alî Asûriyan ve hatin rakirin.(H8 32) Herodot jî vê salé wek 1225 nîşan dide û wiha berdewam dike: di sala 1160 an de êlên mîna

Thrak, Thyn, Bîthyn, Phryg û Mys an drîşî welatê Hatiyan kirin. Pişti wan yekemin car koçberên Grek hatin Anatolê.(84506) Ji vê hatine bişûnde jî, êdî şaristaniya Grekan bi pêşdikeve. Çawa me got Misiriyan ji şaristaniya gelé Arran sûd wergirt, Grekiyan jî ew kirin û şaristaniya xwe User hîmê Arranan bi pêşxistin. Bi nêrîna min ew jî hêjayî lêkolînan e.

Ji hatina Helenan ya Anatolî ye şûnde, êdî navekî nû li Anatolî ye danîn. Wek birêz Ocalan jî dibêje Frîgya yî, Lîdya yî, Hîtîtên mayî û Lûwî di nava xwe de helandin. Cîranê xwe yê rojhilat jî, kraltiya Komagene bû. Vê dewletê Semsûr, Meletî, Elezîz, Mereş, Dîlok û Riha dikire nava sînorên xwe. Wata vî navî gelé cotkar û xwedî pez e. 'Kom' îro jî wek mezra bi kar tê û 'gen-gel' jî bi mana gelê.(75) Heredot, Xanthos û Strabon dibêjin: Hîna ku Frîgya yî (-Ermen) nihatibûn Anatolê, Li Macaristan û Romanya yê li keviya Tûna dijîn û ew ji êlên Tiraq in. Seramîkên wir û yên dora Kizilirmak û Troya wek hev in.(87 I25) Dibe ku ew seramîkên derketinî yên Iskît-Sakayên li herdû coğrafya jiyayî bin. Wî gelî ez wek kalên Kurdên li dervayê Welat dibinim. Yanî ew alî jî gereg bê lêkolîn kirin.

Bi hatina gelên ji golan û Asûriyan û bi îxaneta êlên di federasyona Hatî de, împeratorî di sala 1250 an de hilweşiya.(75) Bi taybetî jî kolera ku di sala 1338 an de pêk hatî, gelé Hatî teva kir û piştî vê Asûr bi rehetî ketin nava dewletê û heynan. Piştî dewlet tê ruxandin, êlên ji bin sîwana Hatiyan belavbûnî mîrîtiyên bajara avadikin. Pir balkûşe, ku di herêma ku Kurdên Anatoliya Navîn cara dawîn jê hatinî de ava bûne. Evna: 1-Tabal (Kayserî-Mersîn), 2-Meletî (Meletî- Komagene), 3-Gurgum (Mereş jî têde ye û ji alî Hîtîtan ve hatiye avakirin), 4- Qeretepe (Nû hatiye avakirin), 5-Adana, 6-Kummuş, 7-Sakcagozu, 8-Sam'al, 9¬

Arpad, 10-Tell Tainat, 11-Til Barsip, 12-Karkhemiş ê. Gor Mihotûlî radigihîne;

ew bajar dewletê di navbera dewletên bi hêz de wek tampon bi kar dianîne.187'

88)

Bajarên Hîtît

Li VVeranşehre û Kurdistanê em rastî peyva "Tomast" tên û peyveke bi wî rengî di zimanê Hatiyan de jî heye. Wekî tê zanîn penêre bi rûnî ku di yara de amade dibî re tomast tê gotin.(V339) Yanê mastê bi rûn e.

Li ser vê babetê Muazzez Çix wiha dinivîsîne: "Ji kral Telepînu şûnde di welatê Hîtîtan de tevlîhevî çedibê. Kaşka/en li bakûrê welatê wî belav dijiyan hertim êrî§ên kraltiyê dikirine. Çi diketiye destên wan dişewitandine û dişkânane. Di ve navbera de Tuthakiya II an dibe kral, ku jina xwe jî Nikalmatî bûye. Ji wan şûnde jî Arnuvanda û Aşmunikal derdikevin hole. Di dema Arnuvanda de, Kaşkan erîşe xwe pir dijwartir kiribûn û kral nedizanî ewê çibike? Biryarê dide ku ji Xwedê alîkarî bixwaze û wiha dibêje: " Tenê Welatê

Hattî ji Xwedêyên xwe re pak û saf e; tenê em hûrmeta te digrin.. .Emê dîsa mî, ga yen xwe besî, nan û şerabe peşkeşe te bikin... Li Nerîk, Hurşama, Kaştama, Hîmuya, Zalpuya ye mizgeftê me xelandin û tişt biritı... Heta Hcıtuşa batin, bajarên mina Tuhaşuna û Tahantariya xelandin... Ji ber bajarê Nerîk î di dest Kaşkayan de ye emê dixwazinî kurbaneyên xwe bişînin bajarê Hakmîsa (Amasya)...' Kral Arnuvanda, bi şerta ku kes îxanetê li kral neke, ji xaqa Hatî hinekê dide begê Kaşka û ji vê yekê şûnde dengê Kaşkan tê vernirandin".(80)

Heyiya Paytexta Hîtît BÎ 1300 Hatûşaş

Ji Hatiyan şûnde xelkêkî nû yê Hînt-Ewrûpî, Frîgiyan Anatolî dagir kirin. Heta rojhilatê Asûr jî belav dibûn. Di sala 1114 an de dema kralê Asûr Tîglatpileser I an xort hate ser text, Frîgiyan got em dikarin erîşî wan bikin, lê ji 20 hezar leşkeren Frîgya 14 hezar mirin, şeş hezaran jî xwe teslimî kralê Asûr kirin. Asûran erdên ku winda kirî hemû heynan û 28 caran ew krala, ji Firat derbasî aliye rojava bû.l69)

MÛŞKÎ (Kurtî)

Gor jêderên ji serdema Hatî, Asûr û Ûrartûyan: li rojhilatê Sêwasê û Torosan qewmeka bi navê Mûşkî dijî û ew ji Aryan bûn. Gor belgeyeka Hati- yan ya serdema davvî nîşan dide, ku li Pahuvalî (Dîvrîxî) yê, Mûşkî di bin sero- katiya Mîta de dibine tehlûkeka mezin.(87 124) Dîsa dîrokên kevn nivîsandine ku Mûşkî, ji 1100 sal BÎ li bakûrê Kurdistanê mîrîtiyê kirine. Heya Kîlîkya û Ka- padokya xistine bin destên xwe. Bi gotina Tewratê jî vana hukumdarî kirine. Ji kevnerêçên dîrokî xuya dibe, ku di sala 1800 an BI de navê padîşahe Lîdya Mîtayê Mûşkî bû. Di wan salan da Mûşkiyan li Lîdya û Kapadokya hukum¬darî dikir.(9'55) Eğer ew dîtin rast bin, kalen Kurdan yê beri ku Grek û Frîgya yî-Ermen û gelên di bên, li rojavayê Anatolê jî jiyane. Kî dizanê ku ne welatê wan î kevn e? Di beşa Hatiyan de jî me dît ku beri xelkên Deryayê hîn tu xelkên rojavayî li van cîhana nedîjîne. Heta mirov dikare bibêje ku di dema volkanik de jî Kurd û xelkê Arranî li wir bûn. Belga vê jî li gundê Buldix (Sêvika, taxa yeşîltepe) heyê; li wir, pekên mirovan yen ber bi rojhilat direvî ye li ser zinarê volkanik hene. Xelk pêl lavaya nerm kiriye û hina jî şopa xwe li wir maye. Dîsa li heman gundî, di şikeften pir kevn de wenêyen xezalan, mirov û tişten din hebûn.

M. E. Zekî îdea dike ku: Mûşkî di navbera Sert û Amedê de dijîn û bi piranî li dora Dicle nîştecîh in. ihtimale ku vana ji Mûşkiyan tene.(191//) Mûşkiyan bi piranî li bakûr û dora Qoçgîrî ya îro dijîn. E. Xemgîn dibêje:

Mûşkî qebîleka ji Xorriyan bû û sala 1100 an de bakûrê rojavayê Kurdistan kirin kontrola xwe. Heta Kapadokya û Kîlîkya sînorên wan dirêj dibûn. Navê bajarê Mûş ji wê qebîlê te. Di sala 770 an BÎ de bi Ûrartûyan va li hember Asûr bûn yek û xwe parastin.<4‘123) Bi baweriya min ji qebîleyekê zêdetir wek federasyoneka élan xûya dike û bi şervaniya xwe derdikevin pûş. Giredana wan û Xorriya jî pir girîng e; ji ber ku ew hemû federasyon êlên ku ji împeratoriya Xorriyan qetiyane. Ihtîmaleke mezine, ku bi hatina xelkên ji deryayê û hilweşandina Hatiyan re ew hilkiştin herêmê çiyayî û bi şere gerîlatî dîsa vegeriyan Kapadokya û cîhên din. E. Cemîl Paşa jî dibêje: Mûşkî, ji Kurdên Sûbarî ne. 1100 sal BI li bakûrê Kurdistanê mîrîtî kirine, heya Kapadokya û Kîlîkya xistine bin destên xwe. Di sala 770 an BÎ de tevî Kurdên Araratê li dijî kralê Asûr Sargonê I an şer kirin û di 612 an de tevî Medan bûn. Bajarê Mûşê ji Mûşkiyan ma ye.(9) Bi vê re giredayî Uyfalvî (Migration des peuples) dibêje: Dihate zanîn ku Mûşkiyen ji Firat heta Kizilirmak belav dibin mirovên Mata (Med) bûn. Zaborovskî jî dibêje, Mata berdewamiya Sumeriyan bûn.<8723) Di Kurdbûna wan de hema hema guman nîne û tevgera wan, bi ya Reşiyan û Canbegan ve dişibîne hevdû. Elêka bi heman navî yê giredayî Reşiya yê niha li çiyayên Lazqiyê dijî û lê mixabin ewê bune Ereb.

Wekî mirov bikare texmîn jî bike; hatina gelên Deryayê wek tofaneke bi ser xelkên Anatolê ve hatiye û hemû ji cîhên xwe veqetiyane. Wekî berê jî

hate tespîtkirin, şerkirina wan û Moxolan wekhev bûye. Ji başûr jî erîşen Asûrî

yên dijwar ev xelkana (F.lên Kurd) mecburî koçê kirin. Gelên Anatoliyê ku di

navbera Asûr û wan de mabû, ji bo parastina xwe helkişiyan çiyayên Qefqasan.

Ji bo parastina wan qelehên herî xwezayî ew çiyayên bilind û newalên kûr in. Ji vê şunda Gurcî, Ermen û grubên élan derketin. Bi vî awayê êlên ji alî Hîtîtan ve dihatine kontrol kirin, ber bi Anatoliya Navîn derbasî tevgerêbûn û bi Asûran rê ketin nav şer. Di nava wan de ewên herî girîng in nîv barbar in, ku navê xwe Gasgas yan jî Kaşkî dihatin nasîn bûn. Kralê Hatiyan her sal erîşî ser wan dikir. Mûşkiyûn ku bi wan re di nav tekîliye de bûn jî, di salên 1165 an BÎ de herêma Alzî û Purulumzî (Çeme Murat-Elêzîz û Firatû-ş) ji xwe re dikirin . * siper.. 65 salan bi şûnde Kral Tîglatpileser 1 an Bİ 1115- 1077 an de erîşî wan kir û ew belav kirin. Asûriyan bi 20 hezar kes erîş kir û pêne kralên Mûşkiyan têk birin. Piştî vê Mûşkî bûn du parçe. Beşek çû dora çemê Kizilirmak, beşek jî li başûre rojavayê Gurcîstanê bi cîh bû û tova qebîla Gurciyan yê bi navê Meskî yan pêk anî.(47) Mümküne ji ber vê be, ku hinek dîrokzan îdea dikin ku Gurcî ji Kurdan veqetîne. Niqteyeka girîng e gor wê dîtine jî ew sererast dibe, lê emê vê yekê ji dîrokzanan re bihêlin. Dîtina min ê di derbare wan îdeyan de ewe,

ku ne tenê Gurcî, xelkên din ên li Qefqasya yê zimanê xwe ji koma Arî jî, yen ji

Kurdan veqetî ne...

Xeleka girîng yek jî di warê ol de derdikeve holê; gor zanyaran Gurciyan ji berê ve baweriya xwe bi Ahûra Mazda tanîne. Li Sevsamora ku li dora çiyayê Bagînetî û Aragvî du şatovûn Ahûra Mazda dihatin parastin. Di sala 330 an PÎ de Gurcî ji Zerdüştî bi dûr ketin û bûn Xiristiyanên Ortodoks.<47) Navê çiyayê Ar-ag-vî jî balkûş e. Li ser vê babetê Koroglu dibêje: Di dema imperatoriya Hatiyan (1450-1180) de, li herêma Elezîzê (Alzî-Elzi-Işuwa-Enzî û Şupa) kraliyeteka bi navê Işuwa hebû ku kralên xwe bi navên ji koka Xorriyan bûn. Piştî hilweşandina Hatiyan qewmeka nû ya bi navê Mûşkî hat Alzî ye. Di navbera wan û Asûran de gelek pevçûn û şer derketin. Ev tekoşîna heta dawiya sedsala IX an berdam kir. Di dema II. Aşşur-naşir-apli (883-859) de seferek li dijî Mûşkiyen rabûnî ser piyan hat kirin. Paşû, di dema III. Şalmanu-aşared (858-824) de jî li ser herêmê gelek zordarî hebûn û wî kralî tam şeş caran ârîş bire ser Mûşkiyan.(56) Wekî tê zanîn li çiyayê Elewî-Lazqiyê jî Kurdên Reşî hene, ku ji vana êlêke navê xwe Mûşkî ne, ji bo agahiyên zêde li ser wan li Kovara Veger ê binêrin.<190) Dîsa li Amed û Rakka yê jî Mûşkiyû hene û ewe giredayî Karaulus(-Reşiya) in.(160 599) Li Yozgatê kela û gundekî bi navê Mûşalimû heye; li Elezîzê navçeya bi navê Mûşar (Aydinlar) heye. Mûşkara jî navê Nevşehîie yî kevn e.(103'589) Hemû îspat didin nîşandan, ku evv beşek ji kalên Reşiyan yên îro ne.

Mihotûlî dibêje: Li hember zexta Asûriyan, Tagal û Mûşkiyan demekê di nava konfederasyona Frîg (Ermen) de cîh girtin. Lewra Tukultînînurta ji rojavayê Firat 28 800 kes biribûn û piraniya wan Mûşkî bûn.(87 125) Xuyaye ku Mûşkiyan-Reşiyan tekîliyên xwe bi Ermenan ve ji demeka pir dirêj vir ve

berdewam e. Ew yeka heta salên 1920 an jî dewam kir. Dîtineyên ku dibêjin hinek êlên Reşiyan ji Ermeniyan hatine ne rast in, lê gelêk têkiliyên germ çêbûne û berovajî hinek Kurd bûne Ermen. Dîsa kralê Urartû Rusa yê II an jî gelek Mûşkî biribûn cîhên ku nû zept kirî. Di seramik û mirî veşartine de jî herêma başûre Qefqasan, rojavayê Iran û bakûrê Dicle û Firat wekhev in. BI 900-800 an de herêma Mûşkî Ketmuhu(?) bû, kralên xwe jî bi navên mîna: Kuştaşpî, Kundaşpî bûn, ku bi kralên rojavayê Iran ve wekhev bû. Ji bo ku senê xwe neditewandin ji wî re digotin "Kurtî".187'12^ Wekî me berê jî got, taybetmendiya wan ê herî mezin ewe; ku serî li ber ti hêzan netewandine. Ew yeka bi kesayetiya Reşiyan û êlên din ê koçber ve hevdû digire.

Sargonê II an, kralê Ûrartû Rusa têk bir (716), ji perestgeha Haldiyan 10 ton zêr, weqas jî zîv, 6110 kolê, 260 asilzade û gelek ajal bir. Lê mecbur ma ku bi Mûşkiyan ve peymanê çêke, lewra Mûşkî li çiyabûn nedikarî bi wan re şer bike, pa§ê di êrîseka Kurtiyan de mir.(S7‘121) Federasyoneka balkeş û şervan e; hêvîdarim lêkolînên kûr û fireh li ser wan bên kirin; lewra hemû federasyonên min nivîsîn û yen ezê binivîsim ji bo dîroka Kurd wekî xelekên zincîrekê ne. Yek yekê aşkere dike.

SUMER (KENGÎ)

Li ser dîroka Sumeriyan gelek guftogo hene; hîna jî baş ni h a tiye tespîtkirin, lê Kurdbûna wan îdeaya herî nêzîkî rastiyê ye. Hinek turkolog jî dibêjin ew Tirk in, lê ev ji zanistiyê dûr e. Wekî tê zanîn, dîroka nivîskî bi Sumeriyan ve destpê dike û tê gotin ku Sumeriyan hertiştekî xwe ji bakûrê Dicle û Firat girtin. Wekî birêz Ocalan dibêje: Ji teknîka cotkariyê bigre hetanî sazivên sereke li vê herêmê pêk hatinî ji bakûr bi xwe re anîn. Sumer gav bi gav ji bakûr ve hatin jêra Mezopotamya yê. Dîroka Sumer û Xorriyan derbasî hundirê hev bûye.(75i Ew tespîteka girîng e. Mumkune ku Sumerî federasyonek yan jî beşek ji Xorriyan bin. Beşek jê vegerî

başûre Mezopotamya û bi hatina Ereban re ew dîsa vegerîn bakûr. Bi têkçûn û belavbûna wan re piraniya wan hatin bakûrê Kurdistanê û wek Hatî hatin binav kirin... Dîtinên ji wê cûdatir jî hene û dibêjin Sumerî ji başûre rojhilat hatin û bi koka xwe re hemû têkiliyên xwe qût kirin û şaristaniya wan di destpêka 4000 sal BI de destpêkir.(é612) Gor vê tespîtê, texmînî ew ji rojavayê Hindîstanê hatine. Torî ji hinek jêderên arkeolojik wiha radigihîne: Jêder nadin xuyakirin ku Sumerî kengê hatine herêmê; lê tişte tê zanîn, dema ew hatin li vir gelên din hebûn. Samî 2600 sal Bï hatin û li bakûrê Sumer bi cîh bûn. Li başûr û bakûr Sumerî di tengasiyê de hiştin. Salên 1900 an BI de jî Sumer ji alî Akadên Samî ve hatin helandin/ asîmîlê kirin.(94'40) Ne dûre, ku beşek ji Sumer çûbin bakûr dîsa û wekî min gotî navê Hatî lê hatibe dayîn. Hinek dîrokzan dibêjin ku ew 5000 sal BI ji bakûr, hinek jî dibêjin bakûrê rojhilat (Derya Kesk) hatin. Gor baweriya min, ew xelka berê jî li herêma hîva bi heyî rûdinişt; lê ji ber sedem yan jî sedemên xwezayî,

zordan yan jî sedemên em nizanin çûn bakûr, li wir wek Xorrî xwe bi rêxistin kirin û dema rewş aram bû jî hatin başûre Mezopotamya. Bi hatina Ereban re beşekî mezin ji wan ber bi bakûr ve çûn. Mirov dikare bibirse gelo ew ne kalen Hatiyan bûn? Ev niqtê hîn zêde hewcedarî ronîkirinê ye. Lê ew ditin ji alî Collîns ve jî tê piştrast kirin.

Arkeolog Sîr Leonard li bajarê Ur kolan kirin, tişten ditinî, bi yen li çiyayên Kurdistanê yen ji dema neolîtîk ve nêzîkî hev-xisim bûn. Vê yeke, di belavbûna şaristaniyû de xeleka qetiya gîhand hev. Ji ber ku; xelkê bakûrê Zagrosan 5000 sal Bİ ber bi başûr hat û bajarên başûre Kurdistanê girtin. Paşe hîn ber bi jêr çûn û 4500 sal BI dest bi avakirina zeviyan kirin. Ew tiştân bi xwe re anîn mîrasa çanda Samarra bû. Bajarê yekemîn ya bi navê Erîdu li Mezopotamya hatî avakirin jî berhema vê çandê bû. Heykelên mîna maran yen li Ur derketine 5000 salan BI bûn; lê heman heykel li

Kurdistanê li salên 6750 an BI de hebûn.(159'322) Ew belgeyên arkeolojik yekîtiya çandî ya bakûr û başûr dida xuyakirin. 4000 sal BI li bajarê Sus ê wêne marêkî bi siro hatê dîtin. Du hezar sal şûnde heman mar bûbû sumbola Xwedê Mardûk.'87 B) Wekî min berê jî nivîsî, gelek balkeşe ku heta demên dereng, mar, di nava Kurdên Anatoliya Navîn û yên rojavayê Kurdistanê de cîhêkî taybet dilîst. Heta roja îro çîrokên Şahmaran tên qalkirin û cîhekî nîv-pîroz nîşan didan. Eger mirov wêneyên maran yên li ser deriyê Lalîş jî hesap bike, dîrokeke kûr digihîjê hevûdû. Di beşa Ezdatî de emê fi reh li ser rawestin.

Li ser dîroka Sumeriyan bê guman Sumerologa Tirk Mûazzez ilmi¬ye Çix gelek salan kar kiriye û ji ser kevirên Sumerên dîrokî gelek berhem afirandine. Em nizanin ew çiqas objektîv e; lewra di pirtûkên wê xanimê de ez rastî dîtinên hîssî hatim û ji bo wê bi guman ez jê sûd werdigirim. Çix, ji şaîrekî Sumerî wiha radigihîne: "Kal û bavên min berî hezaran salan barê vir kirine. Ji ber ku nivîsandin nedizanîn, nenivîsîne ku ji kuderê û çima hatine. Lê ji mezinan hatiye guhên me: Ji bakûrê rojhilat, ji welatê bi navê "Dîlmûn" bi riya deryayê ew hatine. Sedema hatine, li welatê meyî her tim baran dibarî bi salan baran nabarê û herderik ziya dibê û netewe me jî bi her alî de belav dibê. Bapîiên me jî hatine vir. Bajarê min Nîppûr, bavé hemû Xwedayan û kralan Enlîl avakiriye. Kesên din jî hatine bajarekî din çêkirine û kraltiyê bajaran avabûne. Paşê jî bihev re pêşbirka hêzê kirine (bihev re şer kirin-Ş). Yek ji wan kraltiya bajaran ji xaka me gelek dûr bûye, li bakûre rojhilat, piştî çûyina heft çiyayên mezin bajarê Aratta bûye.(8ü) Bê guman belgeyeka girîng e. Ji wê tê fêhm kirin ku xelk ji bakûrê rojhilat, ji ber hişkbûne hatiye. Bajarê Aratta kuder e, tekiliya wî bi çiyayê Ararat û Arran ve çi ye? Lewra peyveka kurdî ye û divê têkiliya wan bi hevre hebe. Yan jî ew li Asya Navîn bûn? Gelek îşaret hene ku xelkê Arranî heta Asya Navîn belav bûye; mirov dikare bibêje herî kêm

heta Xorasanê belav bûye. Ewên hatine îhtîmaleke ku pê§iyên Kurdan yên heft hezar sal berê ku hatine başûre Mezopotamya bin. Li cîhên ku ew gel jê hatî: zêr, zîv û kevirê şinî (zagîn) hebûne. Hema helbestvan dibêje: Hinek ji me "Ser

reşan" li vir bi rîh kirine. Em çima vî navî li iniletê xwe dikin? Tiştekî ecebê ne? Hin em nehatibunî wî cîhî, cîranê me çav şîn û por zere hebûne. Li vir m in tu kesî bi wî rengi nedı! Em ser reş û çav reş in, lê rengê me mina genime, em ne reş in. ,.(79) Xuyaye ku ew belga heja nişan dide ku neteweki kej li wir (Asya Navîn) biye. Di vir de pirsek tê bira mirov: Ew gela kî bû û kejbûna Kurda bi tevlîhevbûna bi vî gelî bi şunde re pêk hat? Iro di nava Kurdan de hejmareka pir mezin kej û çavşîn hene. Ew di nava hemû zarav axifên Kurdan de mewcû- te. Bi taybetî jî di nava Kurden Lor/Ler û kurmancan de pir balkeşe. Çix ji van belgan niqteyek girîng radigihîne: Di xanî çêkirinê de gelek kevirên rengin bi kar dianîn, evê heri girîng jî, kevirê Zagînê yê ku rengê vî şîne, dikirin temele xaniyan û çavên heykelan. Ev kevira jî ji başûre Derya Kesik û ji Afganîstana îro dihat. Bi vê yeke re giredayî jî dibêjine Sumerî ji wir hatin.<80) Iro jî ew kevira di çêkirina tizbıyan de bikar tê, li Xorasanê dostan yek jê diyarî min kiribûn. Bê guman li vir jî girîng e ku em bale bikşînin ser bi navkirina Sumeriyan yê wek "Ser-reşan". Di beşa Xorriyan de jî navê Çûxreşiyan derbas dibû û hîna jî ew nava tê bi kar anîn. Gelo ew tene tesadüfe? Çawa ku kevneşopiya mar bi hezaran salan dom dike, navê Kurdan dewam neke? Porê wan, yan jî kumên ku bi kar tanîn reş bûn? Eğer risên ji hiriya reş bûne xere dikare kum yan jî çilen wan reşbin.. .Yeke jî îro di nava Kurdan (Tirkan jî) de kevneşopiyek heye ku kevirê şîn ji bo bînaçava bikar tînin. Ji sedî sed ew kevneşopiya jî koka xwe ji Zagînê Sumeriyan digire. Ehnek nivîskar jî cüda nêzik dibin:

5.000 sal BÎ di navbera Dicle û Fırat de dijîn. Nivîs be lav kirin, teker afirandin, zevî ajotin, hejmara 60 ku em di saetan de bi kar tînin Sumeran ditin.(U<M9) Di vir de hatina ji bakûrê Dicle û Firat bi ya ji welatê Dîlmûn ve lihev nayê. Lê dibe ku ji cîhekî çûbûn cîhê din û di dawî de jî hatibin başûıe Mezopotamya. Yan jî ji bakûrê Firat heta welatê Dîlmûn ew belav dibûn. Bi dîtina min jî Dîlmûn raste, lewra îspatên wê zêde ne. Tûncer dibêje: Wana bawer dikir ku Xwedê li ezmanan e.(1I9'2U) Ji bo wê jî Zîgurat ava kirine û Kurd heta roja îro qurbanan li cîhên bilind serjêdikin. Li Anatolê jî li Xorasanê jî wiha ye. Mihotûlî dibêje: 4000 sal BÎ bajar dewletên mîna Ur, Urûk û Lageş ava kirin. Sumeran cejna Dûmûzî pîroz dikirin ku wek cejna beran berdanê û Kosegelî ya Kurdên îro ye. Dûmûzî, xwede Kengiya yî pirbûnê/seksê û dûlgirtine.(87'62) Mihotûlî îdea dike ku navê wanî bingehîn Kengî ne û piştre ew wek Sumerî hatine binavkirin. Nivîskar Murşît El Yusif, di navbera Sumerî û Kurdan de girêdaneka bingehîn çêdikê û dibêjê ew ji bakûrê Iraqê daketine û berdewamiya wan netewên di navbera Dicle û Firat de jiyane û ji bilî Kurdan tu miletên din li wir nejiyane.(45)

Kurdistan û Mezopotamya, berî Isa her tim bû qada şer û afetan. Di du belgeyên ji Sumeriyan 2000 sal BÎ mane de welatekî bi navê Kar-da-ka hatiye nivîsandin. Ev welata gorî G. R. Driver li başûre Wanê bû. Nêzîkî hezar salî şunda Tîglath-Pileser bi gelé bi navê Kurtîe tê nasandin re li çiyayên Azû (Flazo-li gor hinan jî vira Sason e, Driver. Di Şerefname de keleheka bi navê

Kardaka', ji bo Kurdan jı civaka 'Kurtı' ye derbas dibe.

Welate Sumeriyan li herema ıro ya wek

te bi nav kirin de hatibu avakirin.

Xelke Samı jî li bakûr û rojavaye wan dijı. Elam u

Gutı jı li rojhilat u rojhilate bakure wan dıjm. Lı cem krale bajare Niş Urzababa, termandarekı bi nave Sargon (2334-2279 BI) kar dikir. Piştre krale xwe kuşt li ser text runişt u dewleta Akad İİ ser bingeha Sumeriyan firehkir. Sargon lcomkujiyek pir hov li hember Elam pek anı. Le îttîfaqa Gûtı u Sumeriyan dawi li xanedana Sargon anî.172 Di gotin: Beyi ku bizanibin wana di rastiye de kare Xwedayen Sumeriyan pek dianın:
Enlıl qesra xwe ya je hezdikirı windakir. Çaven xwe zivirand (çexe) çiyan, çexe welate dujminan kir. Wi bangi xelkekî li çivan kir, ev xelka ne weki ye din bun, ew Gutı bun. Vana mma xelken din kanûn nasnedikirin. Tevgera wane weke mirovan bu, le axaftina wan dişibiya leketina kuçikan. Enlîl banî wan kir ji çiyan. Tiştek ji desten wan en direj xelas nebu..." Reyen maden u yen taciriyê ku ciiçûn Sûrivê jî di deste Gutiyan erişen Gutiyan ku ji Zagrosan hatin ew welat xirab kirin û di dawi de jı kirin bin destên xwe. Lewheyên àxî yê derketî de nivîskarêk welatê Sumerî wiha tarif dike: Welate me di nava du çeman de ye û deşte. ji çiyayen Amanus dar; ji

çiyayen Ebla mermer u kils, ji Hahhume zer, ji Meluhha ye zıv, ji Elama rojhilat

sifir, ji çiyayen bakur jı bazalt te.

Pişti mirina Sargon zaroken wi welat fireh kirin, neviye xwe Naramsin

(2254-2218) gor tabloyen derketî: got ez Xwede me u Sumen xeyidandin;

Xwedaye Sumeriyan Enlîl û perestgeha wan Ekur bi erdê re kire yek. Xwede

me pir bi hers ket u çaven xwe berdan rojhilat û Gûtiyên hov en ku li wir

dijın ajotin ser Naramsîn. Hêza Naramsin pê nevestî/têre nekir ku wan

mirovên mina meriyan hatim rawestîne. Ji vê yeke bişûnde tuneyı li welatê

me bu. Gutiyan bajaren me hemu xirav kirin; le mırıtiya bajarı ya Lagaş azad

berdan. Bajaren mma Ur, Umma, Nippur û Urûk ji Lagaş re cîh hiştin. Li wan

bajarane de heri zede Sumen le dijın. Car caran ez difikirime: gelo vana yek

ji milê (êl) milete me ne? Gutiyan hema hema 130 sal welate me birevebirin

şunde, ji bajare Uruk, Utuhegale (2123-2113) Sumen xwe kire kral û serhilda.

Nivıskarekı me dınıvısına ku: Wı, Gutiven mma boçik u maren çiya, even ku

kralê me dibin welatên din, welatê Sumer bi dijminan tijî dike, mêran ji jinan, zarokan ji dayikên wan diqetînin, ji xaqa me avêtin. Kralê wanî dawî

Trîgan dîl girtin.(79) Balkeşe ku Gûtiyan dest navêtin bajarên ku Surnerî lê bi piranî ne û gor belge jî nivîskar dikeve teredûtê ku ew jî milekî netewê wan in ku rastî jî ewe. Tê gotin ku Asûriyên li bakûr dijin, erîşî Nippurê kirine û wira jî mîna bajarê Cr xirab kirine.(79)

Sumer <6613)

Amorît: bi eslê xwe ji Samiyan in, BÎ 2000 an de ji rojava erîşî Mezopotamya û bakurê Sûriyê kirin. Li her derê bajarên Amorîtan çêkirin: Mari, Harran, Nahor, Qatna, Ugarît. Babîl dibe paytext. Serokê wan BI 1750 an de Hamûrabî ye. Wan Amorîtana li rojavayê Mezepotamya, di herêmen deşt û çiya digehêjin hev de koçber dijîn. Dema xelkê nişstecîh ji hêzê ketin, wan eriş kir, navenda wan jî bû Harran. Bi wan erîşan re Sumerî ji meydana siyasî rabûn. Di lêkolînan de hatiye ditin ku li Harranê serokên élan hebûne.(81) Berî Amorîtên Ereb jî, tê zanîn ku mirovên herêmê (Sumerî) yê bi zimanekî deng

dikiriye. Sumeriyan ev yeka wek helbest nivîsîne Ci li ser lewhekê wiha gotine: Li wan rojan welatê Subur-Hamazî... ji ber şeran Xwedê zimanê di devê wan de guhart.(8I) Şaîre Sumen Ludîngîrra (zilamê Xwedê) wiha nivîsiye: Min dema vê nivîsî, biyaniyan welatê me birêve dibirin. Ji ber vê gelek zimanên cûda li welatê me dihatin peyivandin. Ji bo ku: Ziman, huner û jiyana me ji bîr nebe ez dinivîsîme. Pêwîste em him Akadî him jî Sumerî bizanin. Akadî, zimanê evên ku me birêve dibine. Ev herdû ziman qet naşibin hevûdû. Zimanê me yek, du yan jî ji sê kîteyan pêk tê. Bi zedêbûnê cûda yan jî gotinan didin rûhev jê wate derdixin. Mînak: "e" tê wata mal; "ete" jî ji mal; "lu" di wata zilam; "gai" di wata mezin de ye; dema em tînin keleka hevdû "lugal" dibe mêrê mezin. Ji bo nivîsê jî zaravên me hene: Ji prensan re emegîr; ji jinan re emesal. Jin wextê dinîvsînin û dengdikin zaravê xwe bi kar tînin. Vana him zimanê me, him

jî ola me ji destê me girtin û li ser rûniştin. Sargon hertişt ji destê me girt.(79) Ji vê belge aşkeretir ti tiştûn din nabe û vekirî dide xuyakirin ku çand û zimanê kalên Kurdan ketiye bin destên Ereban û ew kirine malê xwe..

Di zimanê Sumerî de hem bandora Xorriyan, him jî bandora Amorîtan (Samiyên ku ji başû r hatine) heye; lê ev nayê wê watê ku Sumerî ne qewmeke orîjînal in. Di dîrokê de ti şaristaniyen ku mina wan bandora xwe heta roja îro li ser dîrokê heye nîne.(72)

Zimanê Sumerî

"Cîranan, ji bo ku cinê ketine hundiiê jina min derxin çûn cem jineka ku sihrê bikin anîn. Jinikê kaseyek nav bi xwê û av tijî anî, pêlên dara ilgin ê avêtinê û av avêtin ser jina min. Pa§ê dû kir û ronahî li dora jina min gerand, paşû jî bi bronzekî dengê bi tirs û xof derxistin û gotin: "Cin-no, nexweşîno, Uduk a xirav, ala xirav, îblîs, ji laşû Navîrtûmê derkevin".(79) Ew sîstema nexweşî xwe§kirinê berî 50 salî li Anatoliya Navîn jî hebû. Di navbera herdû bûyeran de qet cûdahî nîne û tu dibêjî qey di navberê de pêne hezar sal derbas nebûne. Li herêmê ji vê nexweşiye re "Al Basma" dibêjin ku ew bi tirkî ye. Navê xwe yê orîjînal nayê zanîn û ew nav ji xwîn herikandina ji jinên nû zarok çêkirî girtiye. Piştî zarok anînê xwîn nasekine û li gor baweriya wan pîrejinek tê û

tişte zikê jinike dibe, xwin diherike û jinik dimire. ji bo ku cin bi ser nekeve,

pêwîste nexweş şiyar be. Ji bo we ji dengan derdixmin, teneke u firaqan

lihevdixin, tifingan diteqmin, gun u pore jinike dikşmin. Pişti hezaran salan

ew kevneşopî gelek dişibine hev ku mirov şaşmayı dimine... (Ji Anatoliya

Navin Serpehatiyên Dîrokî -Ş.R. mêzeke). Ji bo we, di navbeyna Kurdan, bi

taybet jî yen koçber û Xorrî, Mîtanî, Hatî û Sumeriyan de hem ji alı diroki ve,

hem jî ji alî civakî, çandî, oh û ziman de gelek nezikati hene.

ï,7. -

— i.*r

Li Anatole, Hititan û

Xorriyan mvisa mixan

kirin. Ugante li Suriye jî

ji ve, nivisa pitan çekirin.

Wan netewan ji Sumer

berhemen wejeyi dianın

û tercüme dikirim17-' Bi vi

awayi Sumeriyan çanda

ku afirandini, bi taybet

jî pêsketine di ali wejeyi

de li hemu hereme belav

di kirin.

my- ••

Nivisa Sumer a aide kral Gudea-2100 BI

LULU (Lûlûbuman. Lubila)

Heta vir me hewl da ku bibejin gele Kurd di serdema kevn de, carna

wek federasyona elan, carnan ji wek konfederasyon u Imparatori dijm. Ji wi

miletı beşek jî Lûlû bûn. Divê ew ji federayoneka elan be. Le iro neviyen wan ki

ne ? Em nizanin. Ihtimaleke mezine, ku ew mezinen Kurden Lor-Lek-Leran u

Bextiyarî bin. Vana di salen 2334 (2360) an BI de, li hereme Suleymam, Şehrızor

û Zahavê dewleteka Kurdan a bi hêz, di rêbertiya kral Anubanî de ava kirin. Dewlet heta sala 612 an BI berdewam kir. Bi Gûtiyan ve bûn yek û ji Hîlwanê heta Kerkük kirin bin kontrola xwe. Di pirtûkên ku bi zimanê xwe nivîsandinî de qala şere bi Akadiyan re dikin. Di salên 2300-2233 an de bi Akadan re şer kirin û serokê Lûlûyan Satunî dîl ketê destên wan. Ji vê tarîxê şûnde bi Gûtiyan ve bûn yek û heta dewleta Akad ji holê rakirin ev yekîtî berdewam bû. Di belgeyeke de hatiye xwendin ku hinek kral û rêvebirên Asûriyan ji Lûlûyan bûne. Ji herêmê Lûlûyan re Loristan tê gotin û hinek êlên vê herêmê koçî Sûriyê kirin.(59) Ewên ku çûne Sûriyê jî beşek jê çû Cezayir û beşûn din jî di dirêjahiya dîrokê de hinek vegeriyan Loristan û hinek jî ber bi Derya Kesk ve çûn.

Di sedsala IX an BI de paytextê Lûlûyan bajarê Zîmriye bû. Medan, Asûr ji holê rakirin bi şûnde, Lûlû bi Medan re hatin girêdan. Gor dîtina birêz Tori, Kassiyan di bin serokatiya Gandaş de, sala 1760 an BI de çûne Lorîstanê. Beri koçê, welatê wan bakûrê Dicle bû ye û li wir bronz çêdikirine; di kolonan de ew yeka derketiyê holê. Beşek ji Lûlûyan, vê demê hê li rojavayê Kurdistana îro dijîne.

Prof. Dr. M. Atok Kaşgarli di pirtûka xwe ya bi navê: "Dogu ve Güneydoğu Anatolu Uygarligina Giriş" de wiha dinivîsîne: Gelé Zagrosan yê yekemin

Lûlû (Lubîla) û gelé nêzîkî çemê Diyala yê bi navê Gûtiyan bûn ku dapîrên Kurdên îro ne. Di sedsala XVII an BI de Kassî li Lorîstana îro bi cîh bûn û li Babîlê 600 sal bûn desthilatdar. Cara yekemin wan hesp anîn herêmê û li cem Kassiyan hesp pîroz dihate ditin. Rêvebirên Kassiyan bi Mîtaniyan ve xismên hevbûn. Kralê Elaman sedsala XII an BI de, Kassî ji holê rakirin. Kassî jî bapîrê Kurdan in, lewra eslê Kassiyan ji Medan e. Bê gu man ji holê ranabin lê hêjayî gotinê ye ku ewên rizgar bûn vekişîn çiya, yan jî çûn cîhên din. Wextê çûn cîhên din jî navên wan bi rengekî din di dîrokê de derb a s dibin. Wekî me di beşa Hatiyan de jî göte, di esas de navê wan ne Hatî bûn lê ewên nişteçîh ew nava li wan kiribûn.

S. Mihotûlî balê dikşînâ ser xelekeka girîng a ku xelkê Elam/Ilam bi Arranan ve digihîne hev; ew xal ji bo koka Kurdan girîng e. Li ser vê wiha dibêje: Xelkê Elam ji xwe re digotin Hatamî; di kolanên Sus de hate îspatkirin, ku ew 4000 sal BI hatine wê herêmê.(8748) Peyva Hatamî bi hatî ve nêzîkî hev e, lê çiqas tekiliya wan heye hê navê zanîn; mümküne yek bin jî. Di dema kral Kurî Kum (2670-2660) de yekîtiva Hatamiyan hate çêkirin û kraltiya Aryan avakir. Paçê Sargon ê yekan di navbera salên 2725-2670 an de bajar û welatê Aryan heta Kerkük girtin. Lê Aryan serî dananîn û vekişîn çiya yan. 2500 sal BI jî Gûtiyên hîn li jor, di bin serokatiya Şarlak de dest bi dagirkirina başûr kirin.1187 481 Di beşa Arran de jî min gotibû ku Asûriyan ji bo Kirmanşah6 peyva Arya bi kar tanîn ku divê ji navê vê dewletê girtibin.

Kralê Lûlû, Anu Bananî di nivîseka xwe ya ji 2800 sal BI de mayî dibêje: Welatê Zihaw-Helwan di bin desthiladariya min de ye. Dîsa di vê nivîsê de em fêr dibin ku Gûtî di bin rêvebiriya Lûlûyan de bûn. Tê fêhm kirin ku ji hem an

milete, lê êlên xwe cûda bûn.(9495) Belê ew fedarasyon bi hev re di nav tevgerê de ne. Cama yek serkê§iyê digre û derdikeve peş cama jî ya din digre.

Di dema kral Ameha de Lûlû û Asûriyan şer kirin û Lûlû têk çûn. Bi ser vê de xelkê Lûlû vekişiyan çiyayên Kisin Kiniya û Pîremîgru.(94'101) Ji destpêka dîrokê vir ve gelé me dema di şeran de têk diçûye direviya çiya. Ew yeka ji rewsa îro ya civakî bigre heta nebûyîna xwedî dewletekê de jî xuyaye.

KASSÎ (Kussî-Huza)

Li ser dîroka Kassiyan Torî dibêje: Di sala 1760 an BI de di bin seroka- tiya kralê xwe Gandaş (1732-1717) de; bakûrê Dîclê, yan jî dora Çemê Divala ji xwe re war girtibûn û li wir dewletek avakiribûn. Gelên li bakûr û bakûrê rojhilatê Derya Kesk di sala 2000 an BI de koç kirin. Ji wana yek jî Hatî bûn û di bakûrê Kassiyan re hatin Anatolê. Bi vê re Kassî hatin Loristanê dewleta Kassî avakirin.<91'133) Ew hatin û veqetîna koman girîng e, sedemên vê jî bê guman gelek girîng in, ku bersiva van dikarin gelek girêkên dîrokî vebikin. Cîhê ku jê hatine baikêşe ku navenda Xorasan e, bere min nivîsî bû ku S. Bilgîn û nûserên din jî vê yekê dinivîsînin. Li vir dîsa pirsa; gelo Kurd ji Asya Navîn hatin yan jî ji başûr çûn vê herêmê? derdikeve holê. Xeleka esasî ya bête ronî kirin ev e. Bi dîtina min Kurd ji başûr çûn navenda Xorasanê. Bi taybetî komên ji wê herêmê hatine bi Kurdên li dervayê welat ve hevûdû bê şik temam dikin. Yanê ew, bi taybetî jî Xorrî, Hatî û yen din, ji her alî ve wek berdewamê hev in. Torî dibêje: di kav û kacaxên derketî de tê xuyakirin, ku beri ew bên herêmê aletên ji bronzé çêdikirine. Bronze derketine rastî salên 2700-2100 û 900-700 an BI tên.(94'80)

Di belgeyeka ji Asûran mayî de tê fehm kirin ku Kassiyan hezar sal BI li herêma xwe bi cîh bûne. Hamûrabî û dewleta Babîl ji ber ûrîşbn Kassiyan

mecbûr diman ku tim bi wan re têbiko§in û qelehan avakirin.. Ji ber örîşen Hayiyan jî xelkê malê xwe terk kirin, îê Kassiyên li Babîl li ber xwe dan û ji êlên li Zagrosan jî alîkarî xwestin. Ev jî te vê watê ku Babîlan welatê Kassiyan dagir kiribûn. Kassiyan, di rêberiya kral Kastîlyas BI 1595 an de dewleta bi navê Kardûnaj ava kirin û Babîl jî di nava sînorên vê de bû. 400 sal li wir hukumdarî kirin. Di dema kral Agumê III an de tê dîtin ku bi dewletên cîran û bi taybetî jî bi Misrê ve elçiyên xwe şandine welatên hev. Di atlasa Bonnîer amedê kirî de jî tê nivîsandin ku sala 1570 an BÎ de Kassî ji çiyayên rojhilatê bakûr hatin xwarê û deşt dagir kirin. 300 salan jî li wir hukumdarî kirin.(66) Di ve serdemê de jî îttîfaqa Kurdan li hember Babîliyan xuya dike. Ji rojhilat ve, yanê ji Zagrosan ve Kassî; ji bakûr ve jî Hatiyan êrî§î Babîl dikirin. Di encamê de Hatiyan di sala 1595 a BT de Babîl dagir kirin.

Gorî lewheyan, sînorên dewletê ji behra Iranê heta gola Urmiyê û sînorên Kurdistana îro dikirin nava xwe. Di derdora salên 1242 an de dewleta Kardûnaj kete krîzeka aborî û xelk ji wir koç kirin. Di derdora salên 1235 a de

Asûriyan di Kardûnajê de gelek kes kuştin û dewlet ji holê rakirin. Kassîtan ji Xwedê re digotin "Huza-Hoza". Çar hezar sal berî zayinê Kassîtan kelpîç çêkirin.(S9) lro jî di ku rdî de huz a Kassiyan wek Xudê-Xuda, van jî mirov dikare bibêje di xvveza de hin tê zinde kirin.

Zanyarên wek Hilprecht, İnekler, Halî, E. Meyer dibêjin ku: Hatî, Mîtanî, Elam, Sumer, Med û hwd ji Arya têne. Kassî jî cara yekemin di dema kralê Babil Şamsulluna 1960- 1923 an BI de li Mezopotamya xuya dikin. Wê çaxê xwe wek Kardûnyaş û Mezopotamya jî wek Kardûnya didane nasîn û hesp difirotin Samiyên dewlemend. Ji bo ku gelek hişk bûn ji wan re digotin Kurtetî jî. Dewleta avakirine jî bi navê Kardûnaj dihate nasîn û heta 1145 salan BI dom kir û dema xwe ya herî baş jî dema malbata Kurî

Kal Zu bû. Kralê Asûr Sanaşerîb sala 705 a Bİ de dema erîşî Zagrosan dike û vê yekê li ser lewheyan dinivîsîne. Di lewheyan hatine dîtin de qala Kassiyên gelek şervan dike. Kralê Pars jî dema di wir re derbas dibûn, mecbur dibûn ku diyariyên giranbiha bide Kassiyan. Dîsa îskenderê Makedonî jî nikaribû wira bigirel87'82-84*

Heredot di berhema xwe ya dîrokî de navê wan wek Kîssîa dide û di alî kincan de vê tarife dike: Wek Med û Persan cil li xwe dikirin û çek girêdidan; tenê cûdahiya wan ji herdûyên din ev bû, ku kumên wan ji metal û serê pozê kuman dirêj bûn.<s4)

Kassiyan dewleta Babîl di sala 576 an de rûxandin û Babîl di bin desthi-latdariya dewleta Kassiyan ya bi navê Kardûnî de ma,(94‘4l)

Kralên Kassî û Kardûnî

1. Gandî (1732-1717)
2. Agum l (1716-1695)
3. Kastîlîas I (1694-1673)
4. Ascheshî (1672-1665)
5. Abiratta (1664-1647)

6

32. Enlîl Nadîn Achche (1160-1158) (94'192)

Ela Kassî ya herî mezin û ya belav dijî navê xwe Bazî bû. Haşmar (tê wata şahin) jî êlêka Kassî ya kevne. Li çiyayên çême Diyala jê dizê rûdiniştin.194' m> Kassî di sala 1160 an de ji alî Asûriyan ve ji holê hatin rakirin,

ASÛR

Li ser koka Asûriyan zêde agahî nînin; min di be§ên derbasbûyî de jî qal kir û tê gotin ku ew mihacirê Samiyên ku hatine dora bajarên Sumeriyan

bi war bûne. Di dû hatina Samiyan, pêleka din a ji xelkê Samiye vê re dibêjin Amorît hat û Samî hîna jî bi hêztir kiribûn. Gelé Samî cara yekemîn li derdora 2300 sal BT de yekîtiya xwe çêkir û wek dewleta Akad derket sehna dîrokê. Pêçengiya vê jî Sargon (2334-2279) kir. Ji bo wî jî wiha dibêjin: Li bajarê bi navê Azûpianu vê li kêleka Eirat jineka ser-keşe qedexa mêran şikand û lawikekî

xwe bû. Dix west vê yekê veşere, da kes pê nehese. Lawik kire selêka ji çiloyên dara çêkirî, bi heriyê sîwax kir û bi ava Firat ve berda. Pêlên avê ew bire Aqqî, kesekî av dikşandî ji avê ew selêka derxist û li wir wek bexçewanek ew mezin bû. Navê Sargon lê danîn. Dayika wî jî keça kralê bajarê Kiş bû. Bi xwe ji xanedana Akadan, yani ji bedewiyên çolê bû.(69) Ji vê bûyere ew encam jî dikare derkeve, ku koka Sargon dibe ku ji miletekî din be jî, lewra di nava Kurdên li Anatoliya Navîn de qala çîrokeka balkûş tê kirin. Li ser esasê vê çirokê neraste ku mirov bêje ew Kurd e, lê ew îhtîmala heye.

Li Anatoliya Navîn heta îro jî qala vê çîroka balkûş tê kirin, ew kesên qal dikin nezan in û xwendin-nivîsandin jî nizanin; yanê ne mumkune ku li cîhekî xwendibin.

Ti şik û guman nîne ku ew ji kalên xwe bi- hîstibûn, çîrok wiha ye: Kralê welatekî di- zewice. Zarokên kral nedibûne. Jinika din dike û ew jê re keçik û lawikekî mîna du topên zêr tîne. Lê hêwiya jinikê pir nex- waz û dilreş bûye. Dema dergûş tên dunê, şûna wan du cewrikên kuçikan davêje ber dayikê. Zarokan jî dike selêkê û bi avê de berdidê. Vê selêkê şivanik ji avê derdixe û mezedike ku du xizan in. Wana mezin dike. Dayika wan jî, dema bixwe dihese dibîne ku wê du cewrik anîne, şerm dike û şaş dibe çawa bike... Mêiê wê tê û dibîne ku jina wî du cewrik anîne; gelek bi hers dikeve û jina xwe li çatê heft rêya li kutekan giredidê. Lawê vê jinikê mezin dibe û dibe kral. Xwîşka wî jî li cem wî ye. Pişt re li şopa koka xwe diğere. Diya

xwe li çata çar rêyan dibîne, tîne mal serê wê dişo û kincên paqij lêdike. Paşê tere cem bavé xwe; damariya xwe dikuje û bavé xwe tîne cem diya xwe...

Ev Sargona radibe û Imparatoriyeka mezin ava dike. Sumer, İlam, bê dijberî heta Heleb (Aleppo), çiyayên Toros, Amanos û heta perava Derya Spî diçe. Li bakûr heta kaniyên Dicle û Firat diçe û Kurdistanê bi giştî dike bin kontrola xwe. Tê îdea kirin ku cara yekemîn di dîrokê de wî Imparatorî çêkiriye. Mêtîn cara ewil di dema wî de destpêkir.<72) Li Sumer bajar xirab kirin, sûrên dora bajaran ji holê rakirin; ji ber tirsa Sumeriyan ku tim li dijî Akad serhildan pêk dianîn ew bê hêz kirin. Akadiyan jî pir bi xwîn serhildanên wan dipelixandin û bi sedhezaran mirov dîl girtin û wek karker-kolê bi kar tanîn. Zarokên kralan tanîn li qesra xwe, perwerde dikirin, propaganda xwe bi wan dikirin û pêwîst biya li dij kralê ku bavên zarokanê zarokên wan bi kar tanîn. Zimanê Akadî li hemû cîhan fermî bû. Li Sumer birevebirên Akad hebûn lê li herêmên din garnîzon ava dikirin û birevebir ji xelkên wêderê dihatin hilbijartin. Artûşa xwe bi çekên nû û zirxan ava kiribû. Armanca wî, ji bo ku payîtextekî nû û baş çêke pêdeviya wî bi destxistina daristan û madenên

Kurdistanê hebû... Gelek maden ji Kurdistan û îranê anîn Akad. Niqta din ê balkeş jî ewe ku ji Sargonê I an (2725-2660) re Şarrukan jî digotine(87'48) ku di kurdî de ew peyva hîna jî bi avayê şerûd-şervan-kese ji şer hez dike bikar tê. Mumkune ku ew nava Kurdan li wî kralî danîbin.

Jêderên Ewrûpî dibêjin: Asûrî û Babîlî ne heman netew in; herdûyan jî ziman, çand, dîrok û nasnama xwe cûda ne. Babîliyan dîrokeka devlemend li piştâ hebûn û dema giredana bakûr derbasî tevgerê bûn ew derê ser sahna cîhanê ketin.(h9) Di pirtûkên dibistanên Tirkan wiha tê gotin: Asûrî miletekî Samî ne. Ji tevlîhevbûna Harriyan zimanekî nêzîkî

Sumeriyan dengdikirin anîbûn meydanê.048'5:>) Dema dewleta Akad avabû şûnde jî, bi sedsalan zimanê fermî yê Asûr-Akad Su merî bû. Du re, xuyaye ku hatiye guhartin yan jî zimanek nû avakirine...

Imparatoriya Akad ji alî Gûtiyan ve gelek qels hate xistin. Ji çiyayên Zagrosan evarê êrî§ dikirin û rewşa Imparatoriyê gelek dikirin tengasiyê. Bi ser erişen Gûtiyan û qelsbûna Akad re Sumerî li başûr ketin tevgerê. Dema kral Shar-Kalî-Sharris di sala 2241 an de mir, şere hundurîn destpêkir û Gûtiyan jî alîkarî didan Sumeran.

Pişti van tevlîheviyan Hamûrabî (1792-1750) cara yekemîn di nava dewletê de yekîtî çêkir û monarşiyeka navendî ya bi hêz sererast kir. Dema wî, ji Babîl re bû dema herî geş û pûş. Bê guman wî ji kelepûra Sumeriyan gelek sûd wergirt û çanda wan kopî kir, wergerand zimanê xwe û li her aliyê dinyayê belav kir. Li dû wî jî Samsu- îluna (1749-1712) hat û di sala 1595 an de Hatiyan ew welata dagir kirin. Kassiyan jî sala 1570 an BÎ de ew welata girtin û 300 salan hukum kirin. Di dema kral Şemsî- Adad ê I an (1725-1695) de Asûriyan, bi qewmên Arî yên li bakûr re dest bi tekoşînû kirin lê bi wan re riya lihevkirinê hilbijartin.

Lewra gor xelkê nîştecîh, bi xelkê koçber re tekoşîn zahmet bû. Kral Tîglatpîleser (1116-1077) di salnama xwe de dinivîse ku çawa xelk di şûr re derbas kiriye, bajar şewitandine, çiya di bin xwîne ve kirine û ji serî yên xelkê keleh çêkirine.(87I18)

Wekî me di beşa Mûşkiyan de jî nivîsî, Asûr bi xelkê koçer re riya aştiyê girtibû. Lewra ew xelka gelek şervan bû, şere gerîlatî baş dikir û direviya çiya. Erîşeka artâşâ gelek zahmet û bi bedel bû li ser çiyan di şopa wan keve. Riya herî aqilane jî bi rêya aştiye vana bê alî kirin bû. Bi vî awayî rê li ber yekîtiya

Kurdan jı digirtin.

Di vê navberê de dema kral Hamûrabî de, elen Cuhi, di rebertiya

Fêxember Ibrâhîm de ketin rêva koçberiyê. Cûhi, li destpeke ji bajare Ur

derketin; çûn Riha, pist re çûn Şam û ji wir jî çûn Misir. Di derdorê salên 1272

an BI de jı ha tin İsrail. Cara peşi bu ku Ibrahim li wir Ismail ne kir qurban u

bi vê tevgere li diji Nemrûd derket. Goça ji Riha texmini li derdora 1300 an

destpêkir û serhejmara wan 25 hezar in, yan jî 72 qabîle bun. Lê çima ji Ur

derketin? Eger ew Samî buna çima hicret kirin? Gelo ew dı esil de ne mileteki

Arranî bin û di nava Sami y an de zimane xwe hatibu gu h art in? Gor ditina

Çix jî, Ibrâhîm (1900-1800), bave xwe Terah, birayen xwe Harran u Nahor ji

bajarê Keldaniyan Ur ê ji bo ku herin welate Kenan derketin u hatin Harrane.

Li wir Xwedê Reb xwe bi Ibrahim nimand u got: Here welate ku ez nişanı te

bidim û bibe qewmeka mezin. Ibrahime 75 sali u jma wi Saray u birazıye xwe

Lût heytîne û tere İsrail. Ji bo hişkiye ji wir jî tere Misir.(8,> Dixwazim bidim

diyarkirin ku demên berê di nava Kurdên li Anatoliya Navin de ew buyera

Ibrahîm-Ismaîl gelek pîroz dihate girtin; îro êdi hatiye ji bîr kirin. Di salen 700

an BI de Asûr êrîsî Cûhiyan dikir; di sala 585 an de jî Babîliyan Qudus heynan

û Cûhî birin Babîlê. Li sala 70 an PI jî Romayî heman tişt kirin.1-'

Seriyên xelqê

Di belgeya ji dema kralê Asûr, Adad-Nîrorî I an (1350-1275 BÎ) mayî de wiha nivîsandiye: "....Kralê welatê Hanîgalbat ê bi navê Şattûara û pa§ê jî kurê wî Wasaşatta li dijî min, serhildan pêk anîn. Min yek dîl girt, yek jî kuşt. Min bajarên bi navê Taldu, Amasaku, Kahat, Suru, Nabula, Hurra, Sûdûkû û Waşşakanu heynan û xirab kir. Heta Firat min kir bin kontrola xwe. Ewê ku rizgar bûn jî ji bo kar bikin, bi jin, mêr, zarok û kalên wan min birin bajarê xwe Asûr. Bajarên dinê herêmê jî min şewitandin û şûna wan kudimmus rişand..."

Di dema kurê wî kralı yê bi navê Salmansar I. (1274-1245 BÎ) jî erişî welatê Hanigalbat kiriye û dibêje: "Bi kral Şattûara re Hitit û Ahlamuyan jî alîkarî kir lê min evv têk birin. Çavên 14.400 keşi min derxistin, min gelek kuştin û kralê wan reviya rojava. Neh navendên rêvebiriyê û 180 bajar min xirab kirin. Ev bajarên li jor û çiyayê Kaşiari, qela Eluhat Sudu, qela Harranu û Kargamişa li keviya Firat min heynan û bajarên din şewitandin.(54) Kralê Asûr Tukulti (1242¬1206) herêma Xorrî ya bi navê Alzî, Amadûnû û Pûrûtûmzî heyna û dixwest ku Xorriyan bişîne Anatolê û şûna wan Asûriyan bi cîh bike.(n)

Di salên 1234-1207 an de, Tukultî-Ninurtu yê I an erişî bakûrê Asûr kir. Kralê Hattiyan kuşt û 28.000 Hattî birin Asûr. Kral tafilê li ser navê xwe bajarekî din çêkir û hostên xwe ji Xorriyan, karkarên xwe jî ji Kassiyan bûn.(69) Di dema Tukutî-ninurta II (884) de Asûriyan Harran dîsa

wergirtin. Di dema Salmanassarê (850) III an de 500 hezar mirovî di nava sînorên Imparatoriyê de cihê xwe guhartine.<69) Di dema Asûran de, xelk wisa ser û bin bû, ku hin bandora xwe îro jî berdawam dike. Emperyalîzmeka militarist bû. Ji alîkî de bi erdê de dûkutan, li ser kutekan rûşkandin; ji alîkî de belavkirin û teror kiribûn sîstemekî birêvebirî û ji mêjiyê mirov §opên qet jê nerî çekirin.<72) Politika Asûran ya heri girîng ew bû ku cihê dagirdikirin vala dikirin, xelkê wir dişandin cîhekî dûr û şûna wan jî Asûrî tanin û bi cîh dikirin. Ew sîstema li Kurdistan gelek bi kar anîn û ew jî bû sedemek ku xelk cîh guhart û çûn welatên din. Taybetmendiya Asûriyan ya ku ji ali her dîroknasî ve tê qebûl kirin ev e; ku mirovên her welatî ku dagir dikirin dişandine cîhên din û şûna wan jî xelkên dinê bicîh dikirin.(68)

Tiştekî din ê balkeş jî di dema Sargon de tê jiyîn. BI di sala 710 an de Sargon bi artâşeke mezin çû ser başûre? Mezopotamya. Kralê Babîl ji ber rêvî. Sargon bi êlên Arran re şer kir û herêma di dest êlên Gambalu, Hindanu û RAŞU-yan de ketin bin kontrola Asûran. Li wir eyaleta bi navê Gambean hat avakirin.(27)

Di vir de mirov bixwaze nexwaze jî, tiştekî tê bîra mirov: Gelo ev Raşûyana, Reşî yê îro li Anatolê, Kurdistanê û Xorasanê dijîn e? Yan jî tenê wekheviya navê heye? îro jî bi vî navî êl li Loristanê hene. Eger ew yek êl-federasyon bin, ev tê wata ku Asûriyan, Raşu-Reşî ajotin Harranê.

Yan jî li destpêka dîroka Asûriyan û di dema kral Sargonê I an de, yan jî di dema Salmanassir de, ew ji bakûrê-rojava birin başûr. Piştre jî ber eqsê vê şandin û bicîh kirin. Lewra polîtîka Asûriyan ya di vî warî de tê zanîn. Xelk ji der anîn û li Riha,

Meleri bi cîh kirin. Dibe ku ji başûre Mezopotamya çûbin Xorasan jî...

Asûriyên ku xelk ji welat û ware wan dikirin der, li ser keviran nivîsîne, ku gelek caran wan eriş kirine Kurdistanê lê ti caran bi serneketine. Ev yeka ji bo hemû dagirkeran derbas dibe.(75) Gelé Kurd ê şervan û pişta xwe dayî çiyan zû bi zû nakeve bin kontrola dagirkeran. Ev yek ji bo roja îro jî derbas dibe.

Di sala 666 an de Asûr gihîştin Derya Ege û kral Lûdîen Guges ji kralê Asûr Asûrbanîbal alîkarî li dijî Kimmeran xwest. Di sala 652 an de ji Lûdîen ji Misir re alîkarî kir û Misir ji desten Asûriyan rizgar kirin.

Ji bo Asûr, Medya girîng bû. Lewra Medya li ser riyên ticaretên bi Afganistan, Hîndîstan û Çîn bû. Ji aliyê din de li wir dikaribûn hespên şer jî peyda bikin. Sargonê II an di sala 716 an de erîşî bajarê Harhar (100 km li rojhilatê Hemedanê) kir û vêder dagir kir. Ew bajara ji xwe re kir navenda şer. Ji wir erîşî Ellipî (Loristan) kir. Di vê demê de kralê Asûr bihîst ku kralê Urartûyan di şere li hember Kîmmeran de miriye; vê carê êrîşî wir kir. Malbata kral dîl girt û cîhên Haldî yên pîroz talan kirin. Asûriyan salên 1400 an BI de nedikarîn têkevin Zagrosan, ew ji belgeyên wê demê tê fêmkirin. Xelkê di navbera Derya Kesk û Zagrosan bi maldarî, zîraat, hesinkarî û xwedîkirina hespan gelek pêşketî bû û bi hunerêka mezin dewara xwe dikir. Ariyan li wê deverê bajar dewletên dora xwe bi sê sûran avakirî çêkiribûn. Ji wan yên girîng: Kişîşîm, Sagbîtu û li rojavayê Ürmiyê Silhez; rojavayê Medya Bît-Sangîbutî, Namrîde Saksukanî bû.(87145) Wekî berê jî min nivîsandî, Asûriyan ji başûre rojhilatê Kurdistanê re digotin Arî; xelkê ji wir heta Derya Kesk jî dibe ku kalên Kurdên Ler-Lor û Bextiyarî bin. Wê demê jî hedadiyê dikirine ku îşaretên wê ji bilî şûr û mertalan mirov li ser kincên jinên Kurd jî dibîne. Bi qasî jinên Kurd ti jinên netewên din hesin, zêr û zîv ji bo sûsa xwe bikar naynin. Ew yeka heta roja îro ji alî Kurdên li Xorasanê, rojavayê Kurdistan û Anatoliya Navîn ve jî bi kar tê.

Di dema kralê Asûr Aşûr-Reş-îşî (1133-1116) de, êlê mîna Ahlamû (Aram), Lûlû û Gûtî tim ûrîşî Asûriyan dikir û ew aciz dikirin. Di sala 1051 an de kraltiya Kurdistanê baca xwe neda û başûrû Mezopotamya ket destê Araman. Araman, newala di navbera Firat û baştım Mezopotamya da mîrîtî saz kirin. Yanî Aramê koçber di salên 1010-970 an BI de derbasî jiyana nişteclh bûne. Bi taybetî jî li keviyên Dicle bajarên nû avakirin. Lê di dema her sê kralên Asûrî mîna Asûr Rabî III an, Asûr-Reş II an û Tîglat Flaser II an de ûrîşû ser êlên Kurd kêm nebûn. Di dema Tukultî-Nimuta II an (BÎ 891-884) an de êlêka Araman ya bi navê Utuateler bi temamî ji holê rakirin. Ela mîna Hindadu, Lake, Suku giredayî bacê kirin, mîrên li Harranê giredayî Asûristanê kirin. Êlên mîna Kardûyan û Lûlû jî koçber bûn. Salmanasar ê III an di sala (BI 858¬824) de ûrîşî Sûriyê kirin û kraltiya Hamma û Şan^ hîna jî di destê Araman da bû. Di dema Aşûrdan (772-754) şere derketî de hevkariya Medan û begên Sûriyê tê dîtin ku bi dîtina min ev tiştekî balkûş e.

Henry Layard radigîne, ku Mûsa ye ji Horon idea dike; ku dema Ninus Imparatoriya Asûr damêzirand xwedivê wî welatî ku hatibû şewitandin û xe-

landin xwedî şaristaniyeka peşketî, di hüner û ilm de xwedî ramanên bilind bûne. Bêrî ku Ninusê Nînova ava bike, ew li bajarê Telanê rûdiniştiye. Bi vê re giredayî, hatiye îspatkirin, ku sembol û ayînê dînî yen ku ji kolaneyên bajarên Asûr a kevn derketî bi yên Pers-Kurdan ve mîna hev in. Lê sembola pîroz a ku; mirovekî bi basken mîna çûkaye di nava xelekeke da ye di kolaneyên H bajarên Horsabad, Kuyuncuk û Nimruda nehate dîtin...(68)

Li ser baweriyên Asûriyan A. H. Layard niqteyeka balkeş dinivîsîne: di abîdeyên Asûrî yên kevn de rastı ti işaretön bi agir bawerî anîne nehatiye. Di kolaneyên li Kuyuncuk û Horsabad de, di vê demê de êdî agirperestî di

nava Asûriyan de hêdî hêdî belav dibe. Sembol û ayînên olî li ser silindir û qebertma bi ê Persa kevn ve vvek hev in . Gor lêkolînê wî, mirov dikare bibêje ku Asûriyan baweriya bi roj-agir ji Kurd û Persan girtine. Tişte din ê balkeş jî pere li Asûr û Misir nehatine dîtin. Dîsa Layard radigihîne:

Heta îro di kolaneyên li Asûr û Misir de rastî pere nehatiye. Lê di xaka ku di bin kontrola Pers-Kurdan de, hatiye dîtin ku pere hene; heta pere wan bixwe jî derketine holê. Herodot dibêje: "Gelé ku cara yekemîn pere derxist Lîdyayî ne û ji alî Danus Hystastes ve hatiye derxistin. Ji wî şûnde jî, ji alî kralên Pers-Kurd û Makedonyayî ve hate derxistin û navê xwe jî "Darik" bû.(6fi> Darik peyveka kurdî ye; dar di wata dar de ye; -ik jî, di Kurdî de di wata biçûk kirin û sivik kirinê de tê bikar anîn. Yanê darê sivik-biçûkê... Ji vê jî tê fêm kirin ku cara yekem perê ji dar hatine çêkirin û ev nava lê danîne.

Ji wan agahiyan û yên din ê me nenivîsî jî tê fehm kirin, ku rola dîrokî ya serekiyê ku didin Asûr ne weqas bilind e. Bê guman wana jî keda xwe di şaristaniye de heye, lê ne bingehîn e. Wekî hemû dagirkeran ew jî çanda mi- letên din û yen cîranan girtine kirine male xwe.

ÛRARTÛ (Bîa)

Ûrartûyî jî bo xwe dibêjin "Bîa" û ji welatê xwe re jî dibêjin "Bîanînî"?87 127) Di zaravê Soranî de 'biyanî' tê wata xerîb, 'beyanî' jî tê wata sibe-seda; lê tekiliya vê û Ûrartûyî çi ye nizanim, îhtîmaleke ku ti pewêndî di navbera wan peyvanan de jî tunebe. Di Tewratê de jî wek Ararat derbas dibe. Ararat jî peyveka kurdî ye ku ji ar-agir, -hat/hatinê hatiye. Wexta vî çiyayî agir pijiqandiyê Kurdan ew navê lêdanîne ku ji agir avêtinê derketiye. Xelkê li vê herêmê jiyaye jî, bi rihetî dikare bi navê wî çiyayî bê navkirin. Bi zimanê Asûrî jî, ji Ararat re Ûrartû tê gotin. (Wê çaxê Ûr jî tê wata Ar?). Şirova birêz Torî jî hinek cüda ye: Ew ji xwe re 'bîa-înî', ji welatê xwe re jî 'Bîaîna' dibêjin. îro jî, di zaravê Dimilkî de Piya: Yekine, Ûrartî jî

dibe êl-qebîle. Eger wek vê şirove be, ew tê wata yekîtiya élan. Ew jî ji bo rewşa ew tê de jiya ne şaş e. Eger têkiliya vê bi zimanê Asûrî tunebe, yanê bi bandora wî wek Ûrartû derbas nebûbe, wê demê mirov dikare ji peyvê, wata kesên ji bajarê Ûr hatinî (Ûr-hat-û) jî derxê... Gelo ew ne mumkune?

Dîrokzanê Kurd Torî dibêje: 3000 sal BÎ ji Transqafqasya êlên "Xorrî-Urartû" û meriyên wan hatin. BI di sedsala XIII an de, di bin navê "Ûrartû" û "Naîrî" de Konfederasyona Mîrîtiyên Feodal derketin ser dîrokê û ev yeka bi tehlîka Asûr ve tekildare. Li destpêkê bi navê Urartû ji demaka kin şûnde jî wek Naîrî derketin sehna dîrokê.194 242) Dîtina ku Xorrî û Bîanî yek in û ew wek konfedrasyonê bûn, hêjaye û li gor lêkolîna min jî raste. Dîsa yek bûn û konfederasyona wan û derketina wan ê ser rûyê dîrokê bi Asûriyan ve giredan jî tespîteke raste. Vê dîtinê birêz Torî wiha tîne ziman: 2000 sal BI, Bîaînî wek élan bûn û ji kokê Xorriyan bûn. Bîaînî yê esas li bakûrê Wanê rûdiniştin.194'2591 Dîsa dîtineka ku li şexsiyeta wan tê jî, min berê nivîsîbû ku tê gotin: 1300 sal BÎ gelé bi navê Haltî-Lohorto li "Orarto" rûdiniştin. Ew berê bi navê "Gotto" yanê kesên şervan dihatin nasîn.,127~9) Wekî bi piranî bûyî, li jor jî me qal kir ku Ûrartûyan ji xwe re digotine Bîaînî; lê xelkê din ji wan re gotine Urartû, Gotto û hwd... Gelek caran wiha bûye. Wekî di beşa Hatiyan de jî me gotibû, navê wan ê esas ne ewe û ew navên xelkê lê danîne. Piranî jî ew navana li ser rûpelên dîrokê mayînde bûne. Bi vê re girêdayî mirov dikare îdeaka wiha jî bike: Navê gelé herême Arî û navê welatê wan jî di wata kesên ji cîhê arê/agirê xwe pir hatî Ar-hatî bû; lê wek Ûrartû kete nava belgeyên Asûr û li cîhanê belav bû.

Dewleta Ûrartû, di navbera Derya Kesk, Meletî, Erzirûm, Musul û Helebê de ji alî êlên ji Asya hatî ve di sedsala IX an BÎ li dora Wanê hate avakirin û serokê xwe yê yekemîn Sardûr bû. Hatina wan ê ji Asya sedsalan berî vê tarîxê ye, lê dewlet avakirina wan derdora sedsala IX an e ku sedema

vê jî Asûrî ne. Li hember tehdîda Asûr ew yekîtî û dewleta xwe ava dikin. Alavên ji kolaneyên arkeolojik derketî nîşan didin, ku têkiliya Ûrartû û Saka/ Îskîtan jî hebûye. Rimên zîvînî yên bi dû devan, şûmn hesinî, cil û bergên hespan, mircan û ti§tên din nîşana vê tekîliyê ne. Tişte li Zi w iyê-Kurd i stan derketî jî mîna yên Îskîtan e.(153"39) Ev niqteyeka pir girîng e. Gor lêkolînê min kirî, têkiliya Îskît/Saka, Ûrartû û Xorriyan heye; heta mirov dikare bi hinek ceseret jî bêje ku Saka bi van ve yek in. Lê bi navên cûda û li cografyayên cûda derdikevin ser rûyê dîrokê. Yek jî îdea vê pirtûkê ewe, ku îspatkirina yekbûna wan e; heta, navê Saka/Îskîtan bi Reşiyan û Celaliyan ve jî wek hev derbas dibe ku ew di bingeh de yek in û emê di beşa Saka de li ser wan rawestin.

Kralên Bîaînîyan:

Sardûrî (Sedurî, 840-830)

Îşpuînî (Îşpîna, 830-810)

Minua (810-780)

Argiştî (770-756)

I. Serdûrî (756-730)

Rusa (730-713) û Sardûrî IV (643) ye.

Di dawiya sedsala VIII an de li Meletiyê kraliyetek hebû ku di rojhilatê

Fırat de jî garnîzonên xwe hebûn. Ûrartûyan ji hemûyan re digotin Welatê H/Xate. Di sala 783 a BÎ de kralê Ûrartû Argîşt êrîsî welatê Nîrîbû/Nîrbû yê 1İ keviya Firat kir 30 hezar kes dîl girtin(94 268); kraltiya Meletî giredayî xwe kir û kralê Hatî Hîlarûada mecburê xerecê kir, Tê nivîsandin, ku Meletî bi awayekî aştiyane giredayî xwe kiriye. Ji welatê Xate û Şûpa (nî=Elezîz) jî gelek mirovan birine welatê Ararat (Ardahan/Erbûnî). Ji pêne salan bi şûnde, ji wan 6600 kes derbasî bajarê

li Qefqasya bi navê Erebûne (Arinberd, Erevan) kirin û li wir dane bi cîh kirin. Bi gotineka din, Kurdên vê demê li wir hene. Kral Rûsa yê II (673) di seferên kirî de li zinarên Adilcevazê nivîsiyê ku ji welatê Mûşkî (Elezîz, rojava yê Firat), Xatê (Meletî û der doré wê) û Halitu(Heleb?) mirovan birine welatê xwe. Dema Serdûrî yê II an ji kraltiya Meletî şûnde berê xwe da kraltiya Qûmaha (Komagene, Semsûr), Wita, Halpa (Golbaşi), Parala (Besnî) bi darê zorê bi dest xist û hê neçûbû payîtext Samsatê hate rawestandin û peymana aştive hate çêkirin. Arteşa Ûrartû Fieri zedê heta Semsûrê hat.(56) Wekî ji vir jî xuya dibe di nava Kurdan bixwe de jî, hertim şer û peşbirka êl û fedarasyon- êlan hebûye. Federasyonek yan jî konfederasyoneka élan li ser yen din carna bi zorê carna jî bi aştî desthilatdariya xwe ferz dike,

Rûsa yê I an, der û dora gola Sevan wergirt bi şûnde, 23 herêm girêdayî xwe kirin û ji wan bac stend. Bi vê yekê sînorên welat gîhîşt Qefqasya biçûk û heta welatê Kîmmeran GURÎANA dirêj bû.(94"269) R. Blaga dibêje welatê Kîmmeran, Qirim û bakûrê Qefqasya bû.(95'79) Gor Heredot jî Kîmmer li başüre Rûsya koçberbûn û gelekî pir şervan bûn. Ji alî dijminên wan Îskîtan ve ji cîhê xwe rabûn û sala 735 an BI reviyan Qefqasan. Asûrî jî qala wan dikin. *94"269} Navê vî welatî balkeşe; wekî lêkolînê min kirî îhtîmaleke ku ew Kurdên Goran bin. Fier çiqas di dest min de ispat nebin jî wek îdeayeka hîn zêde bê lêkolîn kirin dixwazim dîsa jî binivîsîm. Heman nivîskar dinivîse ku: Ji bakûr ve erîşî Ûrartûyan dikin û sê caran Urartûyan têk dibin. Ji başûr ve jî wê demê brîşûn Asûr hebûn.*94'270' Bi vî awayî Bîaînî li her derê rastî ûrîşan dihatin.

Argiştî I an li walî Qefqas û Newala Aras de bajarên mîna Argiştîhînlî (nêzîkî Armavîra li Erîvanê), Îrpûnî (Erebûnî-nêzîkî Erîvan-girê Arîn-Berd), Teîşebaînîn (nêzîkî Erîvan-girê Karmîr Blûr) avakir û ji bajarên mîna Hattîna D Sûpanî yê ji rojava jî xelk anî le bi cîh kir.(87 127) Her çiqas îro

li gelek welatan, hebûn û nasnama Kurdan bê înkar kirin jî; wekî xuya dibe gelek bajarên li bakûrê Azerbeycan jî ji alî kalkalkên Kurdan ve hatine avakirin û bi sedsalan ew xaka wek war bi kar anîne...

Di sedsala Dewleta Asûrî yê dawî de, êrî§ên wan ên li hember welatê Kurdan weqas dijwar bûn ku mirov dikare bêje xaka Kurdistan bi temamî vala bû. Cîhên ku vala nebûn jî gelek çiyayî ne û artâşa wan nedikarî bigihîjê. Jan jî ewe serdestiya Asûr qebûl dikirî mabûn. Ji bo wê emê gotinê bidin çend kiralên Asûrî: Kral Tîkûltî Nînûrta dibêje: Min bi 43 kralên Naîrî re şer ki- riye.(94'243) Tîglatpleser di 1112 an BÎ de erîşî ser Naîrî kir, kralên Tûmme û Daîaenî jî di nav de, şer li Bûlanikê pêkhat û Asûriyan ji bo serkeftina xwe

heykelek li wir danîn.,94245) Asûr Nasirpal (BÎ 883-859) dibêje: Çiyayê Kaşîarî (Mazidax) ji alî kurê Lûtîprî yê Tûbûsî ve tê binêvebirin. Min 60 bajarên li wir baş dihatin parastin bi erdê re kir yek... Ji bajarê Tûşa derketim... 250 bajarên welatên Naîri yen baş parastî min rûxand.(94'249) Wekî di belgeyên dîrokî de jî xuya dike bi sedan bajarên Kurdan kavil û kambax kirine û di encama vê de jî xelkê van deran cîh û warên xwe terk kirin û çûn bakûr (başûm Rûsya) û rojhilat (navenda Xorasanê).

Di salên 882 an BI de desthilatdariya Asûriyan heye, lê ji demeka kin bi şunde gelé Xorrî li Mîlîda (Meletî) di bin serokatiya Kalhû (Nemrûd) de rabû ser lingan û dewleta xwe avakir. Di dema kralê Asûr Sargonê II an (721¬705 BI) de ew têk çûn û gelé vir bi darê zorê şand başûre Mezopotamya. Ew ajotina Kurdan ya yekemin têye zanîn. Yanê, cara ewil Kurd nêzîkî 2700 sal beri îro hatine koçber kirin. Heta wê demê, Imparatoriya Asûr ûrîşî dewleta Urartû ya Kurd dikir; ji ber vê sedemê hatiye tespîtkirin ku di navbera Kurdan de wê demê jî yekîtiyek pêk hatiye. Ev di sala 743 an de xuya dike û di bin serokatiya Sardûrî II an de

pêk hatiye. Bi kralê Asûr Tûkûltî-apil-Eşama III an ve li herêma Kiştan û Golbaşi herdû hêz hatin ber hev, lê yekîtiya Kurdan têk çû û kral Sardûrî reviya Wanê.

Salmanassar ê III an di sala desthilatdariya xwe ya yekemîn de wiha dinivîse: "Min ûrîşî Sugunîa Urartû kir, bajar ê kral Aramû ye. Şervanân wî di şûr re derbaskirin, ji seriyên wan min bire çêkirin û 14 bajarên li wan deran min xirav kirin. Paşê gihîştim derya welatê Naîrî.(94~251) Di sêyemîn sala heman kralî de jî wiha hatiye nivîsîri' :... Gihîştim bajarê Arzaşkû yê kral Aramû yê Urartû. Aramû reviya çiyayê Addûrî, min li çiyê êrîşî wî kir û 3400 eskerên wî kuştin. Mîna heriya ku reng bikî, min çiya bi xwîna wan xemiland. Aramû reviya jora çiyê... Min mîna gakî har êrîşî welatê wî kir û şewitand. Li ber deriyêbajêr min serên wan dan ser hevdû, serjê kirin û keç û xortên wan li dora vê kelehê, kom bi kom li ser kutekan rûnişkandi dam û kuştin.(94‘252) Ew hovîtiya pêk hatî û şewitandina welatê Kurdan ne cara dawî ye, bi wan metodan Kurdan welatê xwe yê di nava şaristaniyeka pêşketî de vala kirin û koç kirin. Yek ji sedema belavbûna Kurdan yê fireh ev e. Ji alî din ve navê kral û cîhên cografîk jî ba^ş in. Piraniya wan bi 'Ar' destpê dike. Ew jî delîla Kurdbûna wan e, lewra ar- agir peyveka tenê di kurdî de heye. Pirbûna vê peyvê jî him bi ol re, him jî bi coğrafya volkanik re têkildar e.

Aşşûr Nasirpal II an (883-859 BI) jî wiha nivîsiye: Salmanassar êrîşî we¬latê Naîrî kir. Nêzîkî Hûbîşkîa bûm, artêşa kralê Naîrî Kakîa Manî ji min tirsi- yan û reviyan ser çiyan. Wekî xuya dike ew navekî Xorriyan e.(94'257)

Di dema kral Manûa de, Urartûyan ârîşî welatê Maneiêyan (Mazenderan?) ê li rojhilatê Urmiyê kirin û gelek cîh ji dest wan girtin.(59) Di dema Addadê III an de jî heta Şam û Mansûatê çûn. Manûa bi dewleta Xorriyan li Meletiyê re jî şer kir. Di dema kral Argiştiyû I an de Urartû di

dema xwe heri bi hêz de bû. Li dijî Asûriyan, kralê Urartû Sardûr ê II an û kralê

dewleta Xorrî yê Meletiyê Sûlûma ve bûne yek, lê dîsa jî têk çûn. Ûrartûyên dema Rûsa I an de bi Medan ve di sala 735 an BÎ de bûne yek. Lê Asûran ew jî têk birin û Rûsa li cîhe şer hate kuştin. Kîmmeran jî ji bakûr ve ûrîşî Ûrartûyan dikirin. Di dema Rûsa yê II an de Urartû heta Anatoliya Navîn çûn.(59)

Welatê Bîaînî, ji alî Saka yên ku ji keviya Volga hatibûn ve rastê êrî§an dihat û wêran dibû. Di vê serdemê de êrîfên bê însaf dikirin, bajar bi xelkê wê ve tevîhev dişevvitandin, xwîna dîlan vedixwarin. Kîmmeran jî Frîgya kiribûn vê rew§ê. Lîdyayiyan ew, Medan jî Saka qewitandin. Dijminên Ûrartûyan yên herî mezin Asûr, Iskît û Frîgya bûn.(87'130)

Di lîsta Ûrartûyan de navê 79 Xwedêyan hebû. Di rêza yekemin de Haldî hebû ku li ser şûrekî sekiniye û Xwedayê şer e. Duyemîn Teîşeba (-birûsk), sêyemîn jî Şivnî yê bi roja bi pêrik te sembol kirin.<87 135)

Di dema Sardûrê II an de (764-735 BI) jî Mereş, Samalli (rojavayê Dîlok), Karkamiş û kraltiya Helebê jî bi dest xist. Lê Asûrî di erîşa sala 740 an BI de heta Wanê çûn û welat rûxandin. Bîaînî ji alî Medan ve ji holê hatin rakirin.

MED (-Medeîa/Arîan) û PERS (Artae)

Tê gotin ku yek ji berdewamiya Gûtiyan jî Med bûn. Medan 2000 sal BI ji başûrû Derya Kesk dest bi dîrokê kirin û bûn împerotoriyeka gelek mezin a bi bandor. Erîşûn Asûriyê ku Kurdistan kirî gola xwînê cara yekemîn ji alî Medan ve hatin rawestandin. Li bakûrê Medan Saka-Iskît dijîn, her dem ûrîş tanîn; lê Medan ew di salên 614-613 û 519 an BÎ de têk birin û berê xwe dan Asûriyan. Wek tê zanîn 612 an BI de paytextê Asûriyan kete bin destên Medan û dewleta wan ji holê rabû. Kralê Medan yê vê demê

Key-esker bû. Ew nava tê wata keya yê eskeran. Hîna jî di nava Kurdan tê gotin ku "Tu çi bûyî keyayê ser me?". Kralê Asûriyan Sin-Sar rêvî û çû paş Lîdya. Di dema Imperotariya Med de gelek caran Med, Mad, Kaldahara, Ûrartûyan û Persan li dijî Asûriyan û Misiriyan bi hevra yekîtî çêkirin. Paşê Medan Ûrartû jî kirin nav dewleta xwe (BI 590) û Xorasan jî di nav sînorên Medaîn / Medya / Medistanê de bû.

Wekî ku tê qebûl kirin Med yekîtiya Kurdan ya herî mezin û fireh a ku pêk hatiye. Di pêş û piştî ve yekîtiyê de heta roja îro yekîtiyekê bi vî rengî pêk nehatiye; lê di sedsala em tê de ne daxwazeka bi rengê Medan heye û berbivê ve diçe... Wek tê zanîn, êlên ku Med pêk dianîn ji alî Heredot (BÎ 400) ve hatiye nivisîn: Ew dibêje, ji şeş élan pêk dihatin; wana wek: Busaî (Boûsaî), Strûxades, Parîtakinoi, Bûdîoî, Arîsantoi û Magî dijmêre. Lê di dawiya pirtûkê de Matîen-Matîenoî û Orthokorybanta jî lê zêdê dike.(84 49) Hinek nûser jî dibêjin: piştre derkete holê, ku Magî ne êl e; çîna oldar e. Herzfeld jî dibêje, Med ji pêne beşan pêk tên: Hamadan, Nihawand, Isfahan, Ray, Adarbaicanê.(7184) Ew dîtin hîn zêde nêzîkî rastiyê ye, lewra belavbûna cografîk nîşan dide, lê bi dîtina min dîsa jî kêm e. Her çiqas mirov cesaretê di xwe de nabîne jî, dîsa dixwazim bibêjim ku gor baweriya min êlên ji Medan re

pöşengî kirin Kürden Soran û Hevvreman ên îro ne.

Dîtina ku Medan ji bakûrê rojhilatê Iranê tîne zêde realist nabînim; dibe ku Med bi zora dijminan berjor yan jî ber bi bakûrê rojhilat hilkişîbin, lê belê pê§engên Medan xelkê Kurdistanê yê nişteclh e. Bê guman nayê wê watê ku Medan ji élên Kurdên li rojhilatê îranê dijîn alîkarî wernegirtiye. Med dendikê grubên Aryan ê li Hîlala bi bereket in. Ji desthilatdariya Medan şûnde Faris hatin ser textê Med-Farisan û navê x we ispat kirin. Li ser Farisan dîtina Heredot gelek ba^ş û watedar e: "Kolê Medan yen berê, bûn efendiyên wan ên îro." Tê fêmkirin ku dema Med li ser piya bûn

Farisan ti giringiya xwe tunebû. Heta gelek caran Medan destê xwe di ser wan re girtiye û ew parastine û li cîhên baş bi cîh kirine. Di nava Kurdên Xorasanê de heta îro jî ji bo Farisan dibêjin "Tat" , min sedema vê pirsî û digotin: Ew berê bê qîmet bûn û tu girîngiya zimanê wan tunebû, ji bo vê em dibêjin tat. Di bingehê vê gotine de biçûk dîtinek jî heye ku koka xwe ji hêza împaretorî û şaristanî û qehremaniya Kurdan digre. Heredot ji bo Medan dibêje: "Mirovên esilzade" û ji bo Farisan ti gotinên wiha bi kar nîne. Bê guman va jî bi şaristaniya ku Medan afirandî re girêdayî ye.

Ji bo Farisan du dîtin hene, ya yekemîn dibêje: Faris ji alî fîzyolojîk, fîlolojîk û rûhî ve gelek nêzîkî Kurdan in. Wek miletek yan jî wek pismamên Kurdan tên zanîn. Ya dudûyan jî dibêje: Tu nêzikbûna wan bi hev re nîne. Min di beşa Arran de dîtinên Heredot ên li ser herdûyan dabûn ku ew jî Farisan cüda nîşan dide. Zimanê Farisan jî ne yê Medan e. Faris di nava Medan de heliyan û bûne Arranî. Ji alî hevok çêkirin û ziman de jî ew ji hev dûr in. Di belgeyên dîrokî de gotinên li ser navê Farisan ê balkê§ wek: "Parsûma, Parşûva û Parsûas" hene ku di belgeyên Asûr de derbas dibe. Navê Farisî ji wir tê. Faris cara yekemîn li rojavayê Gola Wanê hatin xuyakirin. S. Mihotûlî dibêje: Salên 1300 BI ew herêma ji alî xelkê ji Hîndîstan hatî ve hate dagirkirin. Wana dans û reqs dikir û bi wê pere qezenc dikirin. Ji bo vê, xelkê berê li herêmê bûn ji wan re got: "Parsek" û ew ji bo koçberên Hîndîstan jî derbas dibû. Di zimanê kurdî de îro jî ji kesên ji xelkê pere, xwarin, cil û tiştên din dixwaze re dibêjin Parsek. Ji vê jî mirov dikare ve sentezê derxe; ku dema Faris hatin Kurdistanê, Kurd nişteçîh bûn û navê Parsek liwan danîn... Heredot dibêje cil, ol, ziman û çanda wan cûda bû. Gor heman dîrokzanî wan ziman jî ji Medan girtin. Bi xelkê li herêmê ve serî di berhevre nekirin, ji bo vê, ji alî Medan ve di sala 815 an BI de cîhê ku li rojhilatê Elam ê bi navê Anzan ji wan re hate dayin. Dr. Ctesîas, di qesta Persan de dibêje: di damarên wan de xwîna Medan

nîne.(87 143) Dîtinen din ên li ser Farisan jî wiha ne: Ecem hîn natibûn Irana îro, îhtîmaleka mezine, ku ew li bakûrê Afganistan û Asya Navîn bûn. Navbera Merv, Belh, Nesa, Gor- gan, Aral û Xezer...<93'78) Bi dîtina min ew ditineka raste; xuyaye ku berî mîladê êlên Fars, Belûc û hinek Kurd ji Hîndîstan heta Afganistan û başûre Rûsya yê belav dibûne. Dîtina din jî cûdaye û idea dike ku: Med û Pers di heman demê de hatin Iranê, BI 1200, û gelé bi navî Kaspî-Zagros ji holê rakirin.<95'78) Gor lêkolînên min kiri, Fars pişti Kurdan hatine herêma îro, îhtîmaleke mezine ku

ew ji dora bakûrê Hîndîstanê û Pakîstanê hatine.

Kalên Kurdan yên bi navê Med, rêvebirên xwe bi hilbijartin tanîn ser text; ew yeka ji alî Heredot ve jî tê pejirandin. Rêvebirê xwe yê yekemîn Diyako bû (727-675 BI) ku wî li hember erişen Asûrî yên qet dawî lênayê ket kampanya yekkirina hemû nişteclhân Kurdistanê. Birêz Izady dibêje: Medan cara yekemîn mîlîsên gel bi kar dianîn.(154'78) Ewên ku bi karanın jî têkiliya xwe bi Kurdên dervayê welat re heye, ku ji bo me xelekeka girîng e. Ji alî din ve vê demê yekkirina Kurdan divê ne zahmet bûya; lewra Kurd li hember zordariyeka mezin bûn, vê zordariyê bajar, gund, mal û milkên wan talan dikir û canê wan jî distand. Li hember dijminekî wiha bê rehm û ji serên wan kelehan avadikî, Kurd bê pirsgirekên mezin tên cem hev û îttîfaqeka bi hêz derdixin holê. Vê yekê, bê guman karê Diyako hêsantir dikir. Di nivîsên li başûre Kurdistan-Behîstun de tê nivîsîn, ku mîlîsên Medan wek "REŞ-AN" dihatin binav kirin.<154~78) Navê Reşan dîsa li vir derdikeve pê§berê me, di dema Xorriyan de jî wek Çûxreşî bû, di dema Asûr de Reşan bû û ji vê dîrokê şunde jî ew derkeve pêşberî me. Nivîskarê vê pirtûkê jî aîdê vê komê ye. Gelo ew tenê rast hatinek e? Gor dîtina min ne tesedûfe û ew kalên Kurdên îro li dervayî sînorên Kurdistan û rojavayê Kurdistan in. Sedema vê piştgiriyê yê yekemîn: Ew ji ber dujmin reviyabûn û tola xwe distandin; ya din dijmin cîhên pîroz girtibûn;

ya seyêmîn Kurdan yekîtiya xwe avakiribûn û mümküne, ku şertân xwezayî wekî hişkbûn û sermayê jî ew mecbûr kiribin. Yanê Kurdên ji zozan û germaviye xwe bi dûr diketî neçar dikirin ku herin ser dujmin û bi wî awayî vegerin warên xwe yên berê.

Li ser yekîtiya Kurdan bavé dîroka nivîskî Heredot jî dinivîse, ku yekîtiya Medan Diyako (728-673) pêk anî. Gundiyekî durist û xelkê jê hezdikirî bû. Xuya dike ku ew yekîtî bi hêsanî û di cografyeka fireh de pêk hatiye. Eger mirov dema serokên din ên Medan jî bide ber çavan, coğrafya ji Anatoliya Navîn heta Hîndîstan û Xorasan çawa bi hêsanî hatibû girtin? Bersiva vê yekê ev e: ku Kurd nişteahum vê cografyayê bûn, wek mîrîtî, kraltiyên serbixwe, nîvserbixwe dijîn û carnan jî bi hevre şer dikirin. Lê bi rêvebiriyeka rast, jê teyî hezkirin û bi dad ew mirîtî, konfederasyon û federasyonên élan bi dilxwazî ketin bin ve sîwane. Lewra ji bo vê yekîtiya mezin ti şeren giran ku pêk hatine û dîrok dinivîsî nînin. Dîsa êrîş û şeren mezin di navbera Asûr û Kurdan de pêk dihat lê vê care wekî bere Kurd ne perçe perçe bûn. Di serdema Diyako ya dawîn de, Sargonê II an Asûr ûrîş kir, 28 bajar hatin talan kirin û Diyako dîl hate girtin; Ew bi malbata xwe ve hate şandinî bajarê Hamatha yê li bakûrê Sûrî. Sargon wiha nivîsiye: " Mirovkujê hov ê ji vê coğrafya hov, ji kralê Urartû Rûsa re mezin dikirin." Paşê kral Rûsa bîhîst ku Asûr bajarê pîroz Mûşaşîr talan kiriye û heykelê Xwedê Haldî jî birine, bi xencera xwe, xwe dikuje. Di vê navberê de Kîmmerên ji ber Sakan direviyan, ew dewletana tehdît dikirin.(87_ 145)

Agahiyên serdema kevn bi piranî ji alî Heredot ve hatine nivîsandin.

Ew, kralên Medan wiha radigihîne:

Deiokes/Diyako 715-675

Phraortes 675-653

Kyaxares/Key-esker 625-585

Astyages 585-550(84o06)

Di sala 674-673 an de li Medya serhildana Kurdan ya li hember dagirken destpêkir. Li destpêkê bi peşengiya beğen Kar Kaşşî, Maddaî, Saparda ew raperîn bi peşket. Vana begên Eksatana Keaştaratî, Mamîtîarşû û Dûssanî bûn û idare di deste Keaştaratî de kom dibû. Ji nava gel jî alîkarî digirtin. Bi taybet jî, ji gelé bi navê "Reşan" ku gelekî bi sîleh bû û jê alîkarî digirtin. Torî li ser peyva reş dibêje: Eger rnirov analiz bike tê wata rêncberên azad û xelk.(94 2%) Reşanâ ku navê xwe derbas dibin em wek Reşî bizanin û vê deme jî xuyaye ku ew komeka şervan û pir bi çek bûye. Ewe ji kevneşopiya tekoşîna wan ê li dijî dujminan tê. Di vir de taybetmendiyeka wan jî xuya dike; ku her dem ji bo şer û alîkariye amade bûne ku ew karekter li Kurdên îro li dervayê welat ve hevdû digre. Reş di wata rêncberî de bi dîtina min ne di cîh de ye, mirov dikare bibêje ku ew koçerên azad û şervan bûn. Yekê jî cîhê ku ew lê dijîn zêde nayê peş, bi qasî tê zanîn ew li navenda Xorasana îro bûn..

Eskerên Med-Pers

A A. ^

Pişti serhildana di sala 625 a BT de Key-esker rêvebirî kire destên xwe. Navê xwe yê esil çi ye nayê zanîn, lê navê ku lê hatî kirin di wata Keya/serokê eskeran de ye. Karê wî kralı li destpêkê ew bû ku arteşeka bi rêk û pektir bîne meydanê. Cara yekemin di dema kral Key-esker de Kurdan artöşeka bi sistem ya ji yekîneyên cüda pêk anîn ku vê mizgîniya serkeftinên peşöroje didan. Key- esker ji Asya beta çemê Halys-Kizilirmak gırt û çû ser Asûriyan jî; lê di vê demê de, Sakayên ku Kîmmer ji Ewrûpa

derxistî, di bin fermandariya kurê Protothyas Medyas de bi arteşeka mezin hatin Asya. Di heman demê de jî di axa Medya de dimeşîn. Îskîtan, çiyayê Qefqasan dabûn mile xwe yê rastê û hatibûn Medya. Li vir bi artâşa Medan re ketin şer, Med têk çûn û İskit li hemû Asya belav bûn. 28 salan li Medya hikumdarî kirin.(84'50) Paşe Key-esker bû dostê kralê Îskîtan Madiyes û serleşkeren wî dawet kirin, serxweç kirin û hemû kuştin. Îskîtan xwe avêt bextê Lîdya.<94'302) Xeleka ji bo me girîng şeıe Îskît-Saka û Medan e. Gelo ew Saka yen ku bi Medan re şer kirin giştik bûn an jî beşek ji wan bû? Yan jî berê îtîfaq, paşe şer kirin û Saka rastî îxaneta Medan hatin? îdeayeka vê pirtûkê ewe, ku yekbûna Reşan/Reşî û Sakan destnîşan bike. Reşan çawa him alîkariya Medan him jî şere wan kirin? Wek nakokî xuya dike. Lê dibe ku beşek ji konfederasyona Sakan, ji ewên dervayê Reşan, ew şera kiribin. Ji alîkî ve rewşa civaka Kurd mirov bide berçavan şer jî dikare bibe. Lewra komên ji hev cüda ne pir bi hêzin, îtîfaqa wan zehmete, tenê dijminekî bi hêz li hember wan hebe ew yekîtî pêk tê. Wekî birêz îzady dinivîsî ew şera piştî ketina Nînova pêk tê, dibe ku Key-esker xwestibe zora aliyê Saka bibe û yekîtiyekê fireh û sexlem avabike. Di vê yekê de eger serketibiya îro dikaribû rewş cûda bibûya...

Li ser çûyîna Saka yê xwe avitî paş Lîdyayiyan wersiyoneka din jî heyê ku tê gotin: Komeka Iskît ji serhildaneka şûnde bi dizî reviyabûn Medya. Li wir Key-esker hakim bû. Kral ew baş pûşwazî kirin; qîmet da wan, zarok teslîmî wan kirin kuew fêrîziman û tîr avêtinêbikin. Sakahertim diçûnnêçîrêû nêçîra ku tanîn tevhev dixwarin. Rojekê tu tişt nanîn. Key-esker ew azar kirin û ku gotin zora wan çû. Wan xwe biçûkbûyî hîs dikirin. Rojekê lawikek ji wan hûr kirin, biraştin û dan ber Key-esker. Piştî vê bûyerê reviyan Sardesê. Key-esker ew ji hukumdarê Lîdya Alyattes xwestin. Lê wî, ew nedan. Ji bo vê pêne salan bi hev re şer kirin, heta ku roj hate girtin. Ji bo peyman û dostaniya di navbera wan de zewaeek jî

pêkanîn. Keçika Alyates Aryenîs dane lawikê Key-esker Astyages û xwîna pî-zendê hev alastin û sond xwarin.<84 38) Ji wan agahiyên ku Heredot dide gelek tişt têne fêhm kirin: Yek ewe ku çima Medan zarokên xwe ji bo ziman fêr bibin teslîmî Saka dikirin? Gelo zimanê wan hîn pakijtir bû? Ew îhtîmaleke mezine, lewra zimanê neviyê Saka ku îro wek Kurdên li dervayê welat xuyadikin xwedî zimanekî di formata kevn de ne. Zimanzanên birêz mîna: Ekrem Altin û Rojan Hazim vê yekê dipêjirînin. Dibe ku wan zimanê kevnparastibe û Medan ji bo vê ew kirin mamostên zarokên xwe... Hostatiya wan ên tîr avêtin bi nav û deng bû. Ji hesin û belgeyên ji Sakan ve manî jî

ew vekirî xuya dike. Niqta din ê girîng jî ewe ku çima wana xwe avêtin paş Lîdya? Gelo Lîdyayî bi hêz bûn yan jî mirovatiya wan herdûyan hebû? Ya din, ji bo pîrozbûna rojê wan şer sekinandin û aştı pêkanîn, kn giraniya rojê li cem van herdû hêzan derdixê holê... Ya dawî jî, Ew kevneşopiya "Biratiya Xwînê" dema ez zarok bûm me jî dikir û wê demê (1970) di nava Kurdên me de edet bû ku ji kesê hezdikî re biratiya xwînê bi vî rengî pêktanîn. Yan zendê hev xwîn dikilin û paşe jî xwîn dihev didan yan jî xwîn dikirin nava avê û herdûyan jî vedixwar. Ji wê bi şûnde dibûn birayên hev.

Li ser hatina Saka birêz S. Mihotulî dibêje: Tê zanîn ku Key-esker hîn zû dixwest erîşî ser Asûr bike, lê bi hatina Sakan re ew neçar ma ku berî vê pirsgirêkê çareser bike. Ji bo vê, di sala 614-3 an BI de dorpêça xwe ya Nînova da alîkî û kete nêçira Saka. Med li bakûrê Medya li şopa Tskît û Kîmmeran gerîn; bi piranî ew ji welatê xwe derxistibûn yan jî wan xwe veşartîbû. Di sala 612 an de dîsa vegerî ser dorpêça pavtextê Asûr. Li ser vî şerî wiha tê gotin: Li dervayê bajêr sê caran şer kirin, Asûriyan li ber Medan nikarin bisekinin û vekişîn nava sûran. Li meha Tebaxê arteşa Med dîsa erîş kir û bajar şewitand û bi erdê re kire yek. Di gelek deveran de tê gotin ku Babîl alîkarî kiriye, lê Babîla vê demê pirsgirekên xwe yen

hundurî hebûn, ew dîtin zêde ne raste. Di sala 609 an de Asûrûbalît ê Asûr li Haranê seri hilda û Misir jî hat alîkariya wî. Lê Medan ew belav kirin.(S7149) Di dirêjahiya vê dîrokê de gelek caran xuya dike ku Misirî diçin alîkariya Asûr. Ji rêvebirên Asûrî ku ji şere Nînova reviyanbûn Haranê, bi alîkariya Misir xwestin dîsa bi serkevin lê Medan firsend nedan wan.

Birêz îzady îdeayeka pir bi nirx dike û hinek bersiva pirsa min a li jor dide: Wexta Medan bakûrê Firat derbas kirin, rastî kraltiyeka Kurdan ya bi navê Zelanî hatin. Zelanî jî, ji ber zexta kralê Lîdya paş vedikişîn. Herdû hêz gîhîştin hev û erîşî Lîdya kirin. Rêne salan şer di navbera wan de ajot û di dawiyê de Zelaniyan di sala 589 an de Kapadokya, 588 an de Pontûs dîsa girtin. Key-esker di sala 585 an de gîhîşt Kurdên li rojavayê Kizilirmakê. Ew erde ku hatî girtin ji Zelaniyan re berda. Kapadokya û Pontûs di sedsala IV an ya BÎ de bi temamî ketibû destên Îranî-axêf û Aryenan.(lw-7t)) Tiştekî balkê§e, ku ve demê jî Kurd li rojavayê Kizilirmak hebûne. Wekî me di beşa Xorriyan de jî gote Kurd ji berê ve li Anatolê hebûn, lê xuyaye ku wana bi temamî ew cîhên xwe terk nekirine û mirîtiyeka xwe li wir avakirine. Navê xwe jî bal keşe ku navê Zil, Zilan, Zerikan tîne bîra mirov. Kî dizane ku ew ne beşa Kurdên ji hev veqetînî yê ku bûne Mil û Zil an û navê Zerikî yê kevne? Ji bo ku ew di ber desthiladariya Medan de ne, gelek pirs tên bîra mirov. Gelo Anatol bi temamî di bin destên Kurdan de bû? Şopên Kurdan yên ku li rojavayê Anatolê û li giravên Ege tên dîtin ji vê pirsê re dibin bersiv, lê dîsa jî em vê yekê ji arkeologan û lêlolînê hîn kur re bihêlin...

Piştî Key-esker, kurê wî Astyages (584-549) hat ser textê Medan, di serdema wî de Asya Navîn, Afganistan û Pakistan re sefer çêkirin.'154'79’ Ji alî

gelek dîroknûsan ve tê diyar kirin ku di salên 585 an BÎ de sînorên Kurdistanê digihîştin Aleksendîpol û Canîka-Samsûnê ya li Derya Reş. Dema Key-esker serdar bû û ji şere Aliyatê Lîdyayî bişunde Kurd êdî li rojava)ê Kurdistanê saxlem bi cîh bûn. Ji alî dewleta Bergama (BÎ 290-129) ve, ji bo parastina dewletê, Kurd bi pera anîn li Anatoliya Navîn bi cîh kirin.

Wekî me li jor jî qal kir, Paris vê demê wek gel ne popüler bûn le kralê Med Astyages xwest destê xwe bi ser ew xelkê hanê re bigre û wan biparêze. Keçika xwe bi navê Merdane da prensê Parsûma (Pars) Kambîs û bi vê re ew bû prensê Anzan. Ji keça kralê Med, Kûroş/Kûrreş ê II an bû. Ji bo vê çîrokek heye ku heta roja îro qal dibe. Heredot ji bo Kûroş wiha dibêje: "...Ew wekî qantiran e, lewra dayik û bavé wî ji dû miletên cûda ne. Dayika wî ji kokêkî baştir dihat, bavé wî weqas ne asilzade bû. Dayika wî keçika Imparatorê Med bû, bav jî mirovekî normal bû.(R4‘46) Di şirove kirina Heredot de jî vekirî xuya dike, ku Parsan vê demê ti giraniya xwe bi kok û binât nine.

Imparatoriya Med ji Kizilirmak heya Gola Kesk, Rê-Tehran, Xorasan û Bûhara; ji wir heta kendava Iranê; ji wir jî heta Helebê dirêj dibû. Ew Kûrosê xwarziyê Kurd di sala 559 an de li Pasargatê serî hilda. Di navbeyna Med û Kûroş de du salan şer berdewam kir û di dawiyê de di nav arteşa Medan de jî serhildan çêbû û eskeran kralê xwe Astyages teslîmî Kûroş kirin. Kûroş kete paytext Ekbatanê û ewder xirab kir. Payîtextê Medan Ekbatana (Hemedan) bû.(3R) Astyages bi darbê ji alî xarziye wî Kûroş pêkhatî ve gêrbû şûnde sûlala Axamenîş a Pers hate desthilatdariyê. Hinek dîtin hene ku dibêjin ew jî Kurd in. Gelek dîroknas vê pêvajoya serketina Pars û têkçûna Medan nîşan dide, lê ne raste. Guhartin tenê di xanedaniyê de ye, ne ya gelekî ye. Pers û Med di heman astan de cîh digrin û herdu jî li peş in. Ve yekê Heredot jî dipejirîne:

Imparatoriya Pers ji 22 Setrapan (eyaletan) pêk dihat. Medan şûna xwe li kelaka Persan bû, dereceya wan heman bûn; rêxistina birêvebirî şîrîkatî bû. Cara yekemin li Qefqasan eyalata Ermeniyan vê demê çebû.<72> Piştî Medan, Axameniya Imparatorî çêkirin û di bin desthiladariya wan de gelek kraitiyên Kurd ava bûn. Yek ji wana yê li rojavayê Elbrûz bû ku ji vê re kraltiya Amard d İha te gotin. Zelaniyan jî tim bi kesa yeti yen kraltiya Axamenî re zewac dikir in û 300 salan bi vê yekê pesnê xwe dan.<l54'82) Kraltiya Amard li başûre Derya Kesk bû û îro jî ji vê herêma re Gîlan tê gotin. Gelek balkeşe ku îro jî êla bi navê E/Amar-lû yê li wir dijî ku tekiliya xwe Reşiyan heye Ci mirov dikare bibêje ku ew herdu jî yek in. Bi dîtina min ew ne tesedufe, îhtîmaleka pir mezine ku ew kraltiya, ji alî heman élan ve hatibe damezirandin. Li beşen peş jî emê bibînin ku xwediyê vê mîrîtiyê ji alî Tirkan ve bên ajotinî Anatolê û ewê li wir jî mirîtiya Dulkadiriyan ava bikin û piştre ji alî Osmaniyan ve bên belav kirin û di dawiya dawî de vegerin cîhê bav û kalên xwe Amard ê... Dîsa zewaca Zeianiyan bi ya Axameniyan re jî balkûş e. Gelo ew du federasyonên ku ji hev veqetiyan yên li cografyayên cûda dijî bûn? Eger di nava wan de xisimatî nebe, çawa dibû ku yek li nava Anatolê, ya din jî li Iranê bû û bihevre dikevine tekîliya zewacê... Ew jî dibe îspateke ku Axamenî Kurd in.

Kûroş textê Medya kire bin destên xwe bişûnde, karê wî yê yekemîn serhildanên Kurdan bi xwînê fetisandin bû, Bê guman alîkarî kirina eskerên Med bi Kûroş re jî balkeşe. Ne duré ku di nava dewleta Med de jî nakokiyên hizbî, êlî, malbatî û çînî hebûn ku Kûroş ji ve sud wergirt û ew bi taahûdan

Nûnerên Setrapên Axamenîş

xapandin... Di nava Kurdên Anatole de navê jinan ê Med gelek popüler e. Ew ne Medine yê erebî ye; di nasnamê de wek Medine tê nivîsîn lê kesek min nedîtiye ku ew bikar aniye. Hemû dibêjin Medê. Mumkune ku ew nava jî Medan yan jîkeça Astyages Merdane hatibe girtin. Heredot dibêje: Di destpêka desthilatdariya Kûroş de astengiya herî mezin grubên mina Bextiyarî, Saka û Misiriyan derdixist. Wî dixwest li hember wan dijminan bi xwe têkeve peşiya artâşe û ji bo îonê jî fermandarekî xwe bişine.(S4 65) Wek hatî ragihandin di serî de Bextiyariyên Kurd, ku xelkê çiyaye û fêrî azadiyê bûne, Saka yen ku em dibêjin kalên Kurdên îro li dervayê welat in serî hildane û desthilatdariya Farisan qebûl nekirine. Koma Bextiyarî, pişti têkçûna Arraniyên li hember îskenderê Mezin jî serhildan pêk anîn kralê Pers kuştin û vekişîn çiya. Wekî tê zanîn heta roja îro ji êlêka bi navê Saka ye giredayî Celaliya heye û li alî Agirî dijîn. Ew herdû mil en Kurdên azad teslîm nabin û cezayê vê jî heta roja îro ewên bi navê Saka dikşînin. Yanê, Kurdên îro bi giranî li navenda Anatole û Xorasanê dijîn Kurdên ji Saka ma ne. Ew serî netewandin heta sedsala XIX an jî dom kiriye; ji bo vê ez dibêjim Kurdên herî dawî teslîm bûne, ola xwe guhartine ew in...

Baysanoglû dibêje: Kûroş, li rojava Lîdya ji holê rakir bi şûnde brîşî rojhilatê Iranê kir. Bi êlên wir (pâş-Tûranî) re şer kir (546-539 BI). Herêmên Bakterêyan, Xorasan, Harezm û Sûgdiyan heynan û heta Seyhûn çû. Saka têk birin û kralê wan Amorg dîl girtin. Arteşa xwe bi wan mirovên mêr û bêtirs teqwiye kir.(U7 841 Nîqta dîrokî ya ku em ji wan bûyeran derxin ev e: Kurdên ji ber erişen Asûr û xelkên Golan reviyane bakûrê Derya Reş û navenda Xorasanê, di d ema Medan de dîsa vegerîn Kurdistanê. Piştî şere Asûr û Medan

ewana xwe avêt paş Lîdya. Bi hatina Kûroş re ew dîsa çûne bakûr û navenda Xorasanê. Yen li wir mabûn ketin bin deste Kûroş. Ji bo tevgera

heman kralı Torî dibêje: Li rojhilat, erîşî jora Amıı-Derya-Vakhsha li Afganîstana îro gele Bactrîc kire bin kontrola xwe. Va jî te vê watê, ku Hyrcanîa (Gurgan û Atrek), Parthîa (Xorasan û Tejen-Harîrûd) ji alî Medan ve hatibû wergirtin. Dragînana (Sîstan) jî di dest Medan de bû.t94"3M>) Di belavbûna Kurdan de rolêke Kûroş ê bingehîn jî li vir derdikeve hole. Yanê di dema Imparatoriya Medan de Kurd ji bo parastina tixûban û dagirkirina w'elatên din belav bun; bi desthilatdariya Parsan re jî ew ji ber kralên wan ê xwînxwar reviyan û belav bûn.

Kralê Lîdya Kroîsos, di sala 546 an de xwest tola Astyages ji Kûroş heyne, le bi serneket. Heredot dibêje: Yûnaniyan erîşî Ilyona kirin û heynan. Bi ser vê de hêrsa Persan li hember Yûnaniyan rabû. Kroîsos bi eslê xwe ji Lydia (Lîdya) bû. Kurê Alyattes bû. Bave wî ji Sûrî heta Derya Reş û ji çemê Halys (Kizilirmak) vir de (ber bi rojava) kire bin kontrola xwe û hinek xelk kire kole, hinek jî kire dostên xwe. Barbare yekemîn e ku Ion wergirt, Aîolîa wergirt, Dorên ji Asya (demên cûda de hatin xaka Yûnan dagirkirin) wana bi xugiyê girêdan û Lakedaîmon (herêmên ji Sînopê ber bi rojava û heta Qastamonû) kirin bin destên xwe. Berê ji Lîdyayiyan re digotin Maîonîa (gor xerîta ku Heredot çêkirî ji bakûrê Agiriyê re Maior tê gotin). Kroîsos ji binemala Mermnadan bû, lê dewlet ji alî binemala kurên Herakles ve dihate birêvebirin. Beri Kroîsos (560 hate ser text) hemû Yûnanî azad bûn...(84'20> Ji van agahiyan encama ez derdexim eve, ku Kroisosî ji nijada Arî-Kurd e. Ew jî hebûna Zelaniyan dide ispatkirin. Di vê beşe dîrokê de tarîtiyeka mezin heye, bi vê re girêdayî şere Troya jî bi dîtina min şerekî di navbera Kurd û Grêkiyan de ye... Ji bo nijada wî ya cûda, Grêkî wî wek "Barbar" bi nav dikin. Grêkiyan ji xelkê Kapadokya re Sûrî yî digotin. Ew Sûriyîna beri têkevin bin desthilatdariya Persan, di bin desthilatdariya Medan de bûn. Kroîsos xwest Kapadokya bike bin destên xwe. J i bo wê Xwedê hêvî dabûyê, lê sedema esas dix west ji Kûroş hey

fa Astyages heyne. Astyages kralê Medan, birajinê Kroîsos û lawikê Key-esker bû. Erîşî Sûrî kir, welatê wan talan kir û ew koçber bûn... Kralê Grêkiyan yê bi navê KandaûloS ku kralê Sardes bû, ji jina xwe pir hêz dikir. Bi zorê ji eskerê xwe vê bi navê Gyges re got were jina min tazî bibîne. Esker mecbûr ma; jinikê ev dît. Di nava Lîdyayiyan û hemû barbaran de tazî dîtin- eger ev mêr be jî- gelek şerm dihate dîtin. Bi zora jinikê Gyges, kiral kuşt û li ser tex rûnişt. Ji Xwedê pirskirin wîjî kraliya wî qebûl kir û herdû malbat lihev hatin. Bi wî şiklîiûvebirî derbasî destê malbata Mermnadan bû. Ji kralê Phrygîa Mîdasê kurê Gordîas şûnde barbare yekemîn Gygesê ku ji perestgehê (Delphoî) re diyarî şandin. Gyges, artâş şand ser Izmir, Netewos û bajarê Kolophon wergirt. Neviyê wî Alyattes, li hember Key-eskerê Medî ji malbata Deîokes re şer vekir. Ji mirina Alyattes şûnde li cîhe wî Kroîsos rûnişt û erîşî Yûnaniyan kir. Ji bilî Kilikîa û Lykîa yan jê re stû xwarkirî yên mîna: Lîdya, Frîgya, Mysîa, Marîandyn, Khalyb, Paphlagoîna, Thrak, Thyn, Bîthynîa, Kar, lon (Konfederasyoneka ji

12 bajaran çêkiribûn, navê xwe jî mîna yen Persan bi peyvekê teva dibûn.) Dor, Aîol û Pomphylîan bûn.(84'20)

Kûroş ji bo ku êrî§ê bibe ser Massagetanê sebir nedikir. Krala/Kralîça wan Tomrîs bû. Bawerî bi rojê dianîn. Ji ve re name nivîsî û têde got ku ew dixwaze ve re bizevice. Tomrîsê jî di bersivê de got: Kralê Medan, ji wî karî dev berde. Gelên xwe birêva bibe û tevlî karê me yê ku em xelkên xwe birêve dibin meve! Arteşa Kûroş çû Aras û bi merdûgana jê derbasbûn. Di şere yekemin de Kûroş bi serket. Tomrîsê jê re xeber şand: Kralê merkujî ji xwîne têr nabî, lawkî min î dîl di destê te de serbest berde û ji welatê me derkeve. Eger tu wiha nekî, bi efendiyê Massagetan rojê sond dixwim ku ezê te bi xwîne têr bikim. Paşâ Tomrîsê şer qezenc kir û Kûroş kuşt. Kine û jiyana Iskît û Massagetane wek hev e.<84'83) Ji ve

nivîsê wisa xuya dike ku Massaget kalên Gurciyan e. Tê zanîn ku ola wan ê kevn Zerdüştî bû lê di salên 300 PI de ew bûn xiristiyan. Idea ku dibêjin eslê Kurd û Gurciyan yekê li ser vê hinekê bi hêztir dibe. Ji alî din ve dîsa Heredot dibêje: Grêkî dibêjin ku Iskît jina bi şîrîkatî bi kar tînin; lê ew êdeta li ba Massagetan heye.(84 83) Ew kevneşopî ya di dema Islamê de ji alî Mazdakiyan û Xuremîtiyan ve jî bi kar dihat.

Kralên Persan:

Kûroş 555-529

Kambuzya 529-521

Darayavahuş 521-486

Hşayarşa 486-465

Artahşatara 465-424(84>

Dema Kûroşû II an (559-529) mir, sînorên dewletê Kurd û Farisan ji Seyhan heta Kizilirmak, ji Derya Kesk heta kendava Pers û heta Misir dirêj dibûn.(94 318) Ew sînor hema hema di dema Medan de jî wiha bûn; kralên Pers li rojava bi taybetî li hember Grêkiyan hîn zêde erd fireh kirin. Ji alî din ve, wekî tê dîtin di navbeyna Heredot û nûserên din de cûdahiyên nav û dîrokê hene; ez wekî wan dinivîsîm.

Dema Kambîs II (529) an derbasî text bû, çû sefera Misir. Ji oldarê Zerduştan Kahîn Patîzetîtes anî cîhê kraltiyê. Wî jî şuna xwe da oldarê Zerdeşt Gomata. Gomata, dixwest bigihîje armancên Key-esker, ji bo vê di sala 521 an de serhilda,(84) lê bi ser neket. Heft malbatên Persan yên mezin gihîştin hev û Daryûs anîn ser text. Daryûs, li seranserî Kurdistan teror û hovîtiyeka mezin ajot: Zana, oldar, desthilatdar û kesên ku ji Gomata re piştgirî dikirin hemûyan kuştin. Ji bo ku zimanê kurdî bide jibîr kirin, bi hemû hêza xwe hewl da.(84‘ 4811 Bi dîtina min Ezîdiyê me ku zimanê xwe baş parastine bi vê serhildanê re têkiliya xwe heye.

Ihtîmaleke pir mezine, ku ew ji ber Daryûs reviyan çiyan û bi sedan salan xwe ji civakê qût kirin û bi serê xwe jiyan. Ew serhildana li dij fetîhên îranê û dinê wan Ormuzd bû. Gomates bi alîgirên xwe ve vekişiya Nîseîa ya li Medya û piştre jî hate kuştin. Di vî şerî de Magî hemû hatin kuştin û ji vê rojê vir ve, cejna "Magophonî" tevkujiya Magan tê pîroz kirin.(84■481, Di

dema Xerxes de, oldarên Medya bi gîştî, Magî jî bi taybetî rastê perçiqandinan hatin. |i ber vê, ji xwe re li cîhên nû gerîn û li Mezopotamya, Sûrî, Anadol, Lîdya, Kapadokya û Pontûsê beiav bûn. Li Lîdya yê ji yezdanê Aryan Anahîta re heykel çêkirin.<71107) Li vir jî tekiliya Lîdya û Magiyan ya olî derdikeve holê ku balkeş e û hêjayê lêkolînê ye... Magî (Mecûsî-rahîbên Zerdeştî): Faris nînin û her tim ji alî kralên Faris ve hatine eşkence kirin. Nivîskarên Grêkî, qala serhildana li dijî kral Dara ya ji alî rahîbê Magî yê bi navê Gaûmata ma ve hatî kirin dike. Dara, di welatê Medan de gelek komkujî kirin û xwîn rijand. Li dijî wî gelek serhildan çêbûn, lê bi ser neketin. Di dema Xerxes de hemû Magî (yanî Mazdaî, Mîthraî û Darûzî) yan ji welat koç kirin 0 li cîhên ku nû tê de tevgerê bajon geriyan. Çûn Mezopotamya, Sûrî, Anadoliyê (Lîdya, Kapadokya, Pontûs). Wekî bê zanîn jêdera wan agahiyan piranî Heredot e û hinek nûser îdea dikin ku ew Magî yen tên qal kirin Ezîdiyên îro ne. F.w îhtîmaleka pir mezin a nêzîkî rastiye ye. Xwedî derketina li ol, ziman û kevneşopiya dê û bavan heta roja îro îspata vê yekê ye. Lewra mirovên xwedî dozên mezin heta mirinê li dû vê bîr û baweriyê diçin.

Di dema Darayê I an de "Riya Kral" ê ji 2575 km an di navbera Sûs û Saros ê de çêbû. Rêyeka taybet bû, meqerên eskerî hebûn ku name dibirin û tanin. Di dema heman kralî de, yekînên eskerî yen taybet jî hebûn. Di nava vê de 10 hezar leşkeıen taybet hebûn ku ji wan re digotin "Eskerên Nemir".(67) Taybetmendiya wan jî ew bû, ku dema yek dimir yekî din

diket cîhê wî û bi vî awî cîhên wan vala nedibû û her tim deh hezar bûn.(72) Heredot dibêje: Key- esker berê Med û Kîssî şandin ser Yûnaniyan, lê ew şûnde vekişiyan û têk çûn. ji van şûnde Persên ku kral digote bê mirin in şandin, ew ji Medan rindtir nebûn.(84) Bawer dikim nivîskar li wir dikeve şaşîtiyê, lewra vê demê Key-esker ne serokê Medan bû. Heman nivîskar wiha berdewam dike: Di şeri? Med- Persan (Dara) û Grêkiyan de, herdû artêş li hember hev bi qasî 8 stadyûman rawestiyan. Cara yekemin Atînayiyan erîşî Medan kir. Li destpêkê wan cesaret kir ku li hember Medan derkevin. Lewra heta wê rojê di nava Grêkiyan de tene navê Medan cîhê tirsê bû.(84'3,6) Heredot di pirtûka xwe de weqas vekirî qala qehremaniya Kurdan-Medan dike, mirov lê şaş dimîne. Wana wek mirovên gir, bi dest û pê û rû dirêj dide xaasîn. Di sala 512 an de Dara derbasî Trakya bû.(72) Di navbera salên 490-480 an de jî welatên derya Ege wergirt. Dara di sala 512 an de ket dû Iskîtan, lê nikarî wan bigre. Ji ber ku ti bajar yan jî navendeka wan ê diyar û cîhêkî kralê wan tunebû.(76) Di vir de jî perçebûna Kurdan dîsa derdikeve holê. Kurdên li navenda Kurdistanê ku dendikê wan wek Med xuya dibe, bi Persan re tevhev beşdarî şeren Yûnan dibin. Saka jê cûdane û tevlî vê yekîtiyê nabin. Heta xuyaye ku hîna jî ew li dijî desthilatdariya Persan in..

M. F. Kirgizoglû li ser babeta Aşxaniyan agahiyên giranbiha dide, gorwan wekî min li jor jî göte, di navbeyna Aşxaniyan/Part û Kurdên li dervayê welat de, girêdanekê derdikeve holê: Di dîroka Iranê de Part wek Eşkaniyan derbas dibe ku di sala 248 an Bİ de serxwebûna xwe îlan kirin. Arsakê T an yê ji

zenda Part û mile Saka re Dahe/Dae dihatî gotin, di sala 256 an BÎ de li ser Belh (Baktrêya) şer kir, Partiya di sala 248 an de dagir kir û serokê wir Andragoras kuşt. Bi vî awayê dewleta Arsak damezirand. Iranı ji wî re dibêjin Eşkaniyan, Grêkî dibêjin Arsakîdas, Ermenî jî dibêjin Bahlavîg. Ji

îndûsê heta Qefqasan, ji Sirderya heta Firat welat di bin desthiladariya xwe de gîhan hevdû. Eşkanî ji Oxûzên kevn û Turkmen bûn. Vana, xwedî navên Irani bûn, gor dewleta xwe yekemin dihatin binavkirin û ji ola Saka-Iranî bûn û giredayî şaristaniya Helenîzmê bûn, lê edetên Oxûzan didan meşandin.(,37'93) Ew niqteyeka gelek girîng e, xuyaye ku nivîskar gelek tiştan tevlîhev dike yan jî bi zanayî dixwraze sergêjiyê bike di heman demê de jî valahiyê dide. Beri hertiştî ez dixwazim navê Eşkanî wek Reşkanî bixwînim. Gelo ew ne mümküne? Ji alî din de xanedanek mîna Eşkaniyan çawa hem Turkmen him jî Iranı dibin? Gor mentalîta nûserên Tirk ew ne mümkün e. Lê Eşkanî-Reşkanî Kurd in! Kürden ku Tirk wek Turkmen û Oxûz bi navdikine! Mirov dikare beje ku beşek ji kalen Kürden li dervayê welat in. Ji milêkî Saka bûna wan jî niqteyeka girîng e. Li vir ev encam derdikeve; ku Saka-Eşkanî-Turkmen û Oxûz yek in...

Iskenderê Makedonî cara çaremin jî bi Dara re şer kir û dîsa zora wî bir û bere xwe da Zagrosan. Wê demê çend êlên Kurd ên ku ti caran bindestî qebûl nedikirin li wir dijiyan. İskender wTana wiha bi nav dike: Kosear (Kasîtan), Dîdonan, Arîbarzanes (Barzan) û Tangî-Roskan.(4'173) Arîbazanes (Ar/agir- berzan) êla Kurd ê ku navê xwe daye Azerbeycana îro ku hêjayê lêkolînê ye. Piştî gelek şeran, arteşa İskender nikaribû d erbaş bibe û mecbûr ma ku vegere Babîl. İskender wiha dini vise: " EWT êlana bi xwe û ware xwe pir bawerin, vê yekê jî dibîne ku ewên berê qêt giredayî ti kraîan nebûne..." Pişti wana hêzen xwe di perwerda taybetî re derbaskirin û di 40 rojan de ji Zagrosan derbas bû.<4173) BT di 312 an de generalê İskender Selêkos destê xwe danî ser welatê Kurdan. Di sala 233 an BI de hemû Mezopotamya kete bin destê Roma. Di 244 an de Şapûre I an ê Fars Antakya, Kapadokya, Hûmûs wergirt û di sala 260 an de Roma li nêzîkî Riha şikeşt.

Dema Ardeşîr jî îttîfaqa Pars û Kurdan, li dijî Iskenderê Makedonî şer kir lê di sala 330 an BI de têk çûn. Ji vêbi şunda jî şeren Roma-Part dom kirin.{52) Di sala 224 an BT de dawî li dema Parta hat û dema Sasaniyan destpêkir. İsken¬der dema herêm dagir kir, belgeyên nivîskî yên bi wrî pêwist heynan û yên din sewitandin. Evên ku hevnanî jî birin Yûnanistan û tercüme kirin.

Zv A

Xiristiyanî di salên 100 an PI de li dora Riha belav bû.(52) Imparatoriya Rom sala 100 an PÎ de bi Sasaniyan ve bûn sînor. Wan herdû Imparatoriyên mezin bi dehan salan li ser axa Kurdistan şer kirin. Kurd dîl hatin girtin, li bazaran hatin firotin, koçber bûn û gundên wan wêran bûn... Gundên wek Şehîd, Kusûbû û Kuyer hatin xirav kirin. Firat ji bo herdû Împaratoriyan bû sînor. Paşû Varharan hat ser textê Sasaniyan û peymana bi Roma re kiri ji holê rakir. Reşî di sala 502 an PÎ de ûrîşî Harranê kirin û 15.500 kes dîl girtin. Di sala 503 an de ketin Amedê û 80 hezar mirov kuştin, Riha dorpêç kirin û xelkê bi

kaniyan kevir davetin û ji ber vê arteşa Sasaniyan reviya. Lê her der tar û mar kirin,(38) Di nav Kurdên ii Anadoliya Navîn de heta deinen dawî evv kaniyana gelek popüler bûn.

Di navbera ziman û çanda Kurd û Farisan de cûdatiyek mezin tune û heta derengî jî ew bi hev re bûn. Ji hev veqetandin di salên 1500 BI de pêk hat: Ji yen li bakûrê rojava yê Iranê re Med, bakûrê rojhilat re Paidî, ji rojava yê baştır û navîn re Pars û ewên li rojhilatê başûr re jî Belûc digotin.(72 75) Gelek dîtin jî hene ku dibêjin zimanê farisî bi kurdî ve jihev cûdaye û kurdî hîn kevintir e... Kesekî ne zimanzan jî dema bala xwe dide Farisî bi hêsanî dibîne ku evv zimanekî bi tevlîbûna zimanên din hatiye holê. FF. Layard dibêje: Persan nivîsa mixa yen aidî xwe bi kar tanîn. Di welatê Fars de heman nivîs li ser her kevirekî tê dîtin. Di parelêlî vê de jî, nivîsên bi

zimanê Med û Babîl jî dihatin nivîsîn. Evji zimanê Asûrcûda ne. Nivîsa mixanjiçep ber bi rast tê nivîsandin. Nivîsa hiyeratîk (suryanî) mîna erebî ji rast ber bi çep tê nivîsandin. Sê cûreyên nivîsa mixan heye: Ya Babîl, Asûr û Med-Pers ê. Seriyên xwe bi îşareta tîrê ne. Ji wan nivîsên sê zimanan li gundê Bisutanê girêdayî Kirmanşah henê û ê aîdê Xanedana Axamenîş in. Li Wan ê jî nivîsên bi sê zimanan yê aîdê Xerxesê henê.

Belga bi sê zimanan

Di derbarê nivîsa Medan de, em pir kêm tiştan dizanin. Ji alî zarava hevgirtina kêran (kama) de bi temamî jî nivîsa Pers cüda ye. ji gelek aiiyan ve dişibine nivîsa Asûr û Babîl. Nivîsandina Farisî bi 39-40 tîpan pêk tê. Asûr- Babîl jî 300 tîpên cüda henê.(fi8) Birêz Ezîzê Cewo dibêje: Di zimanê Medan de tîpên dz, dj-c, tş-ç hebûn ku îro jî wan xwe di nav zaravê kirdkî û soranî de jî parastine. Di nava kurmancan de hatiye guhartin. Dîtina Cewo jî dîtina min ê ku berê jî nivîsî piştrast dike; min gotibû ku: Dendikê Medan ji alî Soran, Hewramanû Goranan ve tê teşkîl kirin. Kurmancû bi taybetîjî Reşan piştgiriya Medan kirin. Cemîl Paşa dibêje: Tîpên nivîsa mixî ya ku Sumerî û Akadiyan dinîvîsandî Kurdan jî pê dinîvîsandin. Paşe merivekî bi navê Misîsûrat tîpên din çêkirin. Berî Kurdistan ji alî Ereban ve bê dagirkirin Kurdan bi Misîsûrat dinîvîsandin.<9) Di navbera Med û Parsan de, ji alî kevneşopiyan ve jî Heredot van agahiyan dide:

Pers, edetên xelkên din pir zû digrin; ji bo ku cilên Medan ji yen xwe rindtir dîtin bi xwe jî êdî mîna Medan li xwe kirin. Dîsa niqteka balköş wiha dinivîse: Pî walî/aliyê din î Tûna (Istros) ango li bakûrê rûbar, gelekî dijî û ez hîn bûm ku ew gelé Siginnaî ye, ku kincên Medan li xwe dikin.(84_249) Divê ew Saka, yan jî zaravaxifê (Lerî?) dine Kurd bin û bere

ew li dora Cola Aral dijîn. Pey va Siginnaî nêzîkî Saka ye û demeke dirêj li bakûrê Derya Reş jiyan. Dibêje: Li ser hespên wan bi pêne tiliyan pirç heye û bêvilên pozên wan pan in. Ji bo siyarbûne nê, ji bo erebe jî ew baş in. Axa wî netewî heta Enet (Venedik) dirêj dibe. Ew koloniyeka ji Medya batine. E w çawa pêk hatiye min fêhm nekir. Le di pêvajoyek sedsalan de dikare her tişt bibe.(S4 24y) Kincên Medan wiha bûn: Li seri ji kulav kumên sivik hebûn, zirxên pî dirêj lêbûn û mîna pûlên masiyan bi pûlen hesinî hatibûn xemilandin; di lingan de potûrên fireh, mertalên ji darê sorkûn, rimé kin, kevanên gir û tîrên ji kamûş û xencêren bi ser çîpê de tenê hebûn. Wekî di beşa Arran de jî me gote: Grêkiyan ji Persan re digotin "Kephen" wana ji xwe re jî "Artae" digotin. Med jî wek Arîan dihatin nasîn. Mediyen ji Kolkhîs, dema ji Atîna vegeriyan welatê Arîan şûnde, navê wan hate guhartin. Med bi xwe wiha kat-qal dikin. (84'345) Çima hatiye guhartin nenivîsiye. Bextiyariyan jî kumekî wek Medan didan serê xwe; tîrên xwe ji kamûş bûn, rime xwe kin bûn. Saka yen ji koka Iskîtan jî kumekî mîna kovikan didan serên xwe. Di lingên wan de poturên fireh hebûn. Ew ji êla Iskîtan yê bi navê Amyrgîa bûn lê wê re Sakes digotin. Tîrkeşâ Arêyan mîna yê Medan bû. Wekî din jî alete xwe mîna ye Bextiyariyan bûn. Part, Khorasîma, Sodgu yan, Gandar û Dadik wek Baktrîan bû.<84 34;,> Wekî tê xuya kirin hemû êl û zaravaxifê Arran mîna hev li xwe dikiline û alavê wan mîna hev bûne. Ew jî çanda wan ê hevbeş nîşan dide.

Imparatoriya Pers û Kurdan li erdnigariyeka pir fireh belav dibû, bi taybetî jî ji salên di navbera 550-331 an BI de, ji Deryaya Ege bigre heta gola Aral, çemê Seyhan û Indûs dikete nava sînorên ve Imparatoriyê. Di sala 500 BI de ew sînorên hanê bêtir fireh bûn; li Asya heta gola Işik, li rojava heta Trakya

û li rojava jî heta Misrê fireh bûn. Di vê demê de, Sakayên Arranî ku ji alî hemû dîrokzanan ve têne qebûl kirin jî, wek du beşan li ser erdnîgariya cîhanê xuya dikirin. Beşekî li rojhilatê gola Aral bû ku li heman herêmê Bextiyarî yên Kurd jî li cografyeka pir fireh belav dibûn. Mirov dikare bibejê ku ji Gola Aral heta kendeva Hindî belav dibûn. Belavbûna wan û Ew ên ji bo me girîng e lewra Bextiyarî û Lekê ji famîlyekê ne. Ihtîmaleka pir mezine ku beşe Saka yen li rojhilatê Gola Aral ew Lekî-Şûxbizinî bin. Beşe din ê Saka jî li bakûr û bakûrêrojavavê Derya Reş bû. Li ser wî xelkê ku gelek balkeş e, emê di beşa Macar û Kurd de bi kurahî rawestin.

MACAR Û KURD (SAKA-ÎSKÎT)

Di gelek jêderên Tirkan de Saka wek Tirk tên nişandan lê bi xwe re jî dikevin nava nakokiyan. Di pirtûka li lîseyên Tirkiyê de têne xwendin de, ji bo Saka tê nivîsîn; ku ew wek konfederasyon hatibûn bi rêxistin kirin û piraniya wan bi eslê xwe Irani bûn. Di heman pirtûkê û paragrafa li jêr jî dibêje ew Tirkên ji Asya Navîn bûn. Gelo hem Iranî û hem Tirk çawa dibe? Gor dîroknûsê îdeolojiya fermî navê Kurdan nine û eger Kurd be jî ew wek Irani bên nivîsîn. Ew dîtineka ji îlm û rastiyê dûr e. Lê rastî çi bû û ew çi milet bûn? Ji bo bersiva vê emê hewl bidin ku wan ji nêzik ve binasin û dîtinên cûda peşkeşö we bikin.

Dema kralê Kurd û Farisan Dara (BI 521-486, gor hinek jêderan jî ew di sala 512 an de ye) derket sefera Îskîtan. Gor gotina Saka bi xwe ji, kralê wan ê yekemin Targîtaos e û heta wî seferî koka wan ji hezar salî zêdetir naçe.<84‘ iy5) Gor vê gotinê, bi hesabekî gilover dîroka wan ê 1500 sal BI destpê dike. Bê guman berî vê jî heye lê xuyaye wana navê xwe guhartine. Ew tarîxa jî hema hema rastê dema dewleta Hatiyan ya 1200 BI hatî rûxandin tê. Ku ji vê demê bi şûnde Kurd li Anadol û Kurdistanê gelek hindik mabûn. Dîtineka din vê têzê rast dike: 1100 sal BÎ Saka, li Pencapa llindîstanê bi cîh bûn. Ereban ji vê herêmê re "Sicîstan" digotin

ku li rojavayê Kabîl û Kandaharê diket.(12824> Li ser vê agahiyê mirov dikare bibêje ku navê Sicîstanî ji Saka tê ku ew jî xwezayî ye. Heta ew nêzîkî peyva Siginnaî ya me li jor qal kiriye jî. Heman nivîskar bi

berdewamî: Netewên li wir bi cîh bûne re Ereban "Etrak/Turk" digotin. Di sala 591 an de bi alîkariya Gokturkan, Saka bûn desthiladarê îran û Bexda ye. Sakayên Xorasanê girêdayî birayê Deryêm Çûpîn bûn ku ji wî re Kurdî dihate gotin. Ji xwîşka wî re jî digotin Kürdiye. Vê yekê Taberî di sala 915 an PÎ de ji jêderên Iranê radigîhîne.(128'24) Saka-Iskîtan di sedsala VII an BI de, ji Asya Navîn, ji kêleka gola Isigol ê dest bi koçê kirin. Milek ji rojava, milek ji rojhilat ve ketin Anadolê û li wir gîhîşt hev. Milekî jî Derya Reş û Kesk kirin nava xwe û der dor zept kirin. Li ser vê axê Imperetoriya bi nav û deng avakirin.(91'73) Peyva Etrak ji bo me pir girîng e ku emê di beşûn li pê§ de li ser wê rawrestin.

Heraklesê Grêkî rojekê gayên xwe dide ber xwe û tê welate Iskîtan. Ji serma radikeve û hespên wî jî diçêrin. Dema ji xewê şiyar dibe ew hespên xwe nabîne. Tê ber deriyê şikeftekê/ heyvanekî joriya xwe jin jêriya xwe jî mar dibîne û hespên xwe jê pirs dike. Ew jî dibêje eger tu bi min re rakevî ezê wan bidim te. Heredot (490-425 BT) wiha berdewam dike: Ji Targîtaos re sê zarok çêdibin: Lîpoxaîs, Arpoxaîs û Koloxaîs. Di dema wan de ji ezman, nîrê ga, bi- virek û kupayek dikeve. Ew wek zêr dibiriqîne. Birayê mezin dibîne lê dema nêzîk dibe ew reş dibin. Yê navîn jî dixwaze bigire lê dîsa ew zêr dişewite reş dibe. Dema yê biçûk nêzik dibe, ew sar dibe û birayê biçûk van alavana dibe mala xwe û dibe kral. Welatê wan pir fireh e. Koloxaîs dike sê dewleta û heryekî dide lawekî xwe. Herakles dibêje kîjan lawê min mîna min tîr amade bike û wî şûrî jî mina min li xwe bike, li wî welatî bi cîh bike. Ewê ku wek min gote nekirî jî ji wî welatî biqewtîne. Zarokê yekemîn navê xwe Agathyrsos, yê din Gelonos û yê biçûk jî Iskît bû.<84 195) Heta dema dawî li Dêrsîm û di nav Kurdên

Anadoliya Navîn de wêneyên Şahmaran gelek dihatin neqişkirin. Di nava keçên li Anadoliya Navîn de, keça berzewac tulan bi wêneyên Şahmaran çêdikin û dikin nav tiştên xwe yên bûkaniyê. Bê îstîsna berê di her malekê de hebû û dihat neqişkirin. Gelo koka xwe dîrokî ji vir tê ? Bi taybetî jî çêki- rina ji alî keçên berzewac watedar e û divê têkiliya wan bi hev re hebe. Lewra Kurdên îro li Anadolê û rojavayê Kurdistanê, bi taybetî jî kirmanckî axêf jî beşek ji Sakan bûn...

Şahmaran

Çîrokeka din heye: Sakayên koçber li Asya bûn. Bi Massagetan re şer

kirin û têk çûn. Çemê Araxes (Aras) derbas kirin û hatin ba Kîmmeran. Tê gotin ku cîhên Iskît lê rûdinên berê di destê Kîmmeran de bû ne. Kîmmer li hember vê bûyerê ketin dubendiyê. Xelkê digot em vira terk bikin û herin. Kralên Kîmmer jî digot em şer bikin. Herdû milên Kîmmeran bihevre şer kirin û yen mirî li kêleka çemê Tyras (Dinyester) kirin erdê û yen din welatê xwe terk kirin. Dema Iskît hatin kes li vî welatî tunebû. Wexta Kîmmer ji ber Iskîtan revîn di Asya re derbas bûn û hatin Khersonessos ê (Çanaqalê) bajarê ku ji alî yên ji Sînopê hatî avakirin. Kîmmer ti cara ji ber avê bi dûr neketin, lê Iskîtan rêya xwe şaş kirin û çûn Medîa.(844%) Iskît ji rojavayê Turkîstanê hatin başûre Rusya û Kîmmerên li wir qewitandin.(84 m6) Texmînî ew di derdora salên BI 800 an de pêk hatiye. Ew Medên li navbera çemê Tûna û Enet ê yên ku Heredot qal dike û nizane kîngê hatine jî, îhtîmaleka mezine ku wê çaxê ji wan Sakan veqetiyabin û li wir bi cîh bûbin.

Li gor dîtina K. Kara, Saka di salên 700 an BI de ji Asya Navîn koç kirin û hatin bakurê Derya Reş û heta çemê Tûna belav bûn. Grêkiyan ji wan re digotin Iskît, îraniyan jî digotin Saka.048 741 Wekî tê zanîn bakûrê Derya

Reş û Derya Kesk bi temamî heta gola Aral di bin kontrola Sakan de bû. Ew herêmêka bi heyî, av û tijî maden e. Lê, ji Asya çima hatine baş nayê zanîn, mumkune ku tekiliya vê "koça qewman" hebe yan jî şertûn xwezayî zor dabe ser wan. Koça qewman jî, bi derketin û ârişkariya Hûnan ve giredayî ye, ku xelkên cîran ji ber wan ji cîhên xwe leqiyan. Wekî me di beşûn berê de jî gote, Xelkên Deryayê (1200 BI) ji rojava ve, Asûr jî ji başûr ve Kurd ji warê wan bi temamî derxistibûn. Di salên 700 an BI de li ser Kurdistanê zilmeke Asûriyan ya gelek dijwar heye ku me nivîsîbû û Kurdistan hema hema bi temamî vala bûbû. Di encama vê de jî vekîtiya Medan derketibû holê. Di yekîtiya Medan de xelkê bi navê Reşan ên ji Xorasan jî hebû, ku gelekî şervan bûn. Ihtîmaleka pir mezine ku ew Reşana, Reşiyen îro ne û beşekî ji Saka ne. Ji bo vê îdeayê gelek îspat hene: Awayê jiyana Saka û Reşan / Reşivan, awayê rexistinê ku herdû jî konfederasyon in, şervaniya wan, nivîsên li ser keviran, navê Sakayı hîna jî di nava Reşiyan de dijî û hwd. hinek ji wan in. K. Kara bi berdewamî wiha dinivîse: Ewên ku çiyayên Qefqasan derbaskirin heta Filîstîn û Sûrî jî hatin. Saka wek konfederasyona qewman hatibûn birexistinkirin, lê rêvebirên wan Tirk bûn. Hukumdarê wan ê heri bi nav û deng Alp Er Tûnga ye. Tekoşîna wî rêvebirî bi kralê Faris Kuroş II an ve bûbû babeta destanan. Firdewsî di Şahnamû de vê wek tekoşîna Iran-Tûran d i ne qişîne.1148 74 * Di Tirk bûna wan de gumanên me yên cîdî hene; Tûraniyên ku tên qal kirin jî bi temamî ne Tirk in. Ew bûyera, perçebûna di navbera gelé Arran de nîşan dide. Yekê jî; dikare hinek dîtin bibêjin ku dema Imparotoriyên Med û Fers li rojhilat fireh bûn, Saka çûn wir û ji wir jî ber bi rojava belav bûn? Mumkune hinek ji vê demê jî mabin, lê Saka hê zû li vê herêmê têne tespît kirin.

Yek ji dîrokzanê Tirkan yê ku dîrok bi kûrahî nivîsî û berovajî kirî C. Turkay e, ku li ser têkiliya Reşî û Saka wiha dinivîse: Cemaata Rûmiyan

SAKA Yûsûfê ji êla Reşiyan e. Ew li: Sîwerek, Semsûr, Nîzîp, Bîrecîk, Rakka, Dîlok, Erzirûm, Qers, Çildir, Ahiska, Sêwas, Meletî, Tokat, Karaman û Aydin ê dijîn.(16ü'637) Dr. Rişwanoglû jî niqteyeka hê girîngtirîn qal dike: Gelek êl ji Hindîkuş, ç i ya yen Elbrûzê di welatê Goran re derbasbûn û hatin Kurdistanê. Ji wana Reşiyen ku bûne Tacik û şaxekî Saka jî heye. Zekî V. Togan jî di- bêje: Reşan/Roşan Sakayên koçber in.(128149) Her sê nivîskar jî yekbûna Saka û Reşiyan dipêjirînin. Têkiliya Tacik û Reşiyan jî pêwîste zêde bê lêkolîn kirin. Ji der de dema mirov li herdû koman dinihêre gelek nêzikatî û wekhevî di navbera wan de heye. Ji alî karekter, fîzîk, ruhiyat û ziman de mirov dikare vê

Bewîste dîrokzan erîşa Saka yê başûr jî lêkolîn b ikin û sedema vê yekê derxin holê. Saka erîşî Anadoliya Navîn û dora Kizilirmak, Sûrî û Medya kirine. Erîşa li ser Medya me qal kir lê yen dinêji alî min ve nayêzanîn. Têkiliya erîşa Anadola Navîn û dewleta Zelanî hebû? Neîhtîmaleka dure ku vana li vê herêmê mîrîtivek avakiribin û piştre bi Medan re bûbin yek. Ji bo tûkoşîna İran û Turan jî emê di beşen pûş de qal bikin ku gor ditina min ew niqteyeka girîng û serekî ye, ku diroknasên Tirk di vir de jî dereweka mezin dikin...

Mümküne ku be gotin Kurd di serdema Medan de çûn Asya; lê Kurd berî vê demê jî li Asya hebûn. Bi taybetî jî dora Xorasan, Derya Kesk û heta çeme Amû-Derya/Seyhan; mirov dikare bibêje ku ew çem di navbera Kurd û proto-Tirkan de sînor bû. Wekî me li jor jî göte Kürden rojava bi hilweşandina Hatiyan re vekişîn rojhilat û bakûr ku Reşanen bi Medan re alîkarî kirîn wê deine jî li wir bûn. Vê yekê dîroknas jî dipêjirînin: Welatê Zabilîstan (Xûr) di nava Xorasan û Hîndîstanê de ye. Di salên 700-600 an Bİ de şûn tı ware Kurdan bûye. Ristemê Zal (Zabilî) li wir bûye. Seferoglû Agahiyên girîng dide: Rojhilatê Xorasan û rojavayê Afganistan di serdema destpêkê û serdema navîn de wek "Sakaıstan-Segîstan" dihate bi

navkirin; paşe gotin Secîstan. Lehengê Kurd ê efsanewî kurê Zal Rustem ji Secîstanê û ji Tirkên Saka bû...(919) Mumkune wî jî ji Taberî girtibe, bê guman ew hevok jî gelek tiştan fêrî me dike. Yekemin ew heiêm welatê Kurdan bûye; duyemîn Rustem Kurde, bi vî awayî Rustem ji Kürden Reşiye û paşe jî çawa Kurdan wek Tirk nîşan dide re mînakeka başe...

Nivîskatên Ereb dibêjin bajarê mina Gazne, Kabîl, Bamyan û Ferewan di dema îmam Osman de bi rêya aştî misilman bûn û ji Osman şunda dev ji misilmantiyê dîsa berdan.(32) Ew tevlîbûn ne ji dilê û xuyaye ku Kurdên wir hêza xwe têr nedikir ku bi eskerên Islamê re şer bikin û misil mantî wek taqtîk qebûl kirin. Pişt re dev jê berdan jî îşareta vê ye ku dema tirs derbas dibe,

dîsa vedigerin ser ola xwe ya kevn, yan jî Zerdeştî. Heman nivîskar: 400 sal BÎ li rojhilatê Kurdistanê Ciloya, Zîwan, Lewalcan, Karyan, Bazencan dijîn. Di ber destpêka misilmantiyê de Kurdên Sirtî (Sirtî-Cirtî) li welatê Herat, Mazenderan, Gîlan û Xorasan dijîn. İlinek dîrokzan jî cîhe wan ji Amedê heta Şemdînan dane diyar kirin.(32) Di beşen peş de jî emê li ser rawestin, lê Kurd heta destpêka Islamê jî li wan herêman man.

Li ser dîroka Saka I. Şahîn van agahiyan dide: Li Bakûrê Iran, Xorasan û Gûrcanê (Cûrcan) xelkekî ji Qefqasya yê bi navê Partiya û Hirkanya dijîn. Li destpêkê bi zimanê Qefqasya Iskîtî diaxifin. Piştî koçê wir kirin êdî bi Medî axifîn. Ji vir pê de Medî bû zimanê wan ê fermî. Partan di sala 175 an BI de bakûrê rojavayê Iran bi destxistin, bi vî awayî herêma Med ketê bin destên wan. Kralê Part Mîtrîtades I (,70'176) li rojhilat, Bextiyarîstan kirê bin destên xwe û li rojava ji Qefqasan heta Firat ketê desthilatdariya wî. Sala 129 an BI de Herat û Arêya ketê destên Partan. Sala 36 an BI li dora Ûrmiyê Dewleta Taçak a Med hê jî hebû. Di şere bi Roma re alîkariya Partan kirin.(94-329) Ëlên Kurd, di bin serokatiya Argû de, di navbera salên 145-29 an BI de bûne yek û li dij Partan, Ermeniyan û Romiyan li

berxwedan û serxwebûna xwe parastin. Dewleta wan 400 salan jiya. Birêvebirên wan navên xwe Abgar bûn. Salên 179-212 an PI de kralê Kurd IX Abgar xaçeperestî qebûl kir û bi vî awayî rêvebiri di sala 244 an de giredayî Roma bû.<59)

Gelek dîrokzan ji bo Sakan hema hema agahiyên wek hev didin; lê li gor dîtina min li ser Saka hê lêkolînên kûr nehatine kirin. Wek Sûzanne Unge jî radigihîne, ew xelkekî bi esle xwe Iranî bû, li bakûrê Derya Reş bi zîraat û maldariyê re mijûl bû. Elên Iskîtên şervan jî, di sala 612 an BI de ji Medan re alîkarî kirin ku paytextê Asûr Nînova girtin.(132 79) Heta vir hemû yek deng in, ku Saka miletekî Arranî ye; Grêkiyan navê Iskît lê daniye; şivan bûne û ji Medan re alîkarî kirine. Ji desthilatdariya Medan bi şûnde jî ew rastî êrîfên Persan tên. Xanima Unge wiha berdewam dike: Di sala 513 an de kralê Pers Dara şerek li hember wan meşand, lê piştî şerekî dirêj xwe bi şûnde vekişand. Di salên 300 an de Sarmetan jî Iskît perçikandin, sedema vê serkeftinê jî, ew şûren ji hesin keşîf kiribûn.(,l2‘79) Dîsa du nivîskarên Swêdî Andersson û Sandwall jî îdea dikin: ku Iskît û Sarmatan giredayî Saceran bûn ku ji malbata zimanê Iranî ne.(153'79) Bi dîtina min Saka û Sarmat du komên Kurdên zaravên cûda ne; wek Kurmanc û Kirdkî lê li ser Saceran em nikarin texmînekê bikim; Mumkune ku nivîskar jî di nava şaşitiye de bin. Heman nivîskar dibêjin: Kinc û stîla jiyana wan jî wek hev bû. Lê xelkên li Asya Navîn ji êlên cûda pêk dihatin û bi taybetî tekiliya wan bi Axameniyên Iranê re hebûn.(153‘79) Ji êlên cûda mebesta nivîskaran zarave axifên Kurd in û di beşûn derbasbûyî de min îşaret bi tekiliya van Axameniyan kiribû. Tê gotin, ku Saceran kumê xwe tûj bûn, şûre xwe qut û du aliyan de tûj bûn. Di artûşa Persan de li hember Yûnan jî şer kirin. Di kolaneyên li rojavayê gola Zaîssan a li alî Tjilikta de alavên derketî jî stîla Iskîtan e, ku bi hezaran kilometer dûr e. Biro§ên sê lingê ji wir derketine

nîşan didin ku ji festen Zerdeştî û ji çanda agir mane.(15379) Agahiyên civakî yê ku nivîskar didin bi yen Kurdên li dervayê welat ve hevûdû digrin. Bi tavbet jî kumê ku tê qal kirin di nava kalên Kurdên Xorasanê de tê dîtin. Min wenêyê bi vî awayî dîtibûn.

Bi dîtina min Kurdên Kurmanc, Lek û Dimiliyên ku li dervayî welat dijîn û beşek jî li rojavayê Kurdistan bi hevre Saka pêk dianîn. Mumkune ku di bin sîwana vî navî de Tacikî, beşâkî Hindi, Macar, Osetî û miletên din jî hebûn. Em vê ji lêkolînên kûr re dihêlin. Lê ez dikarim bibêjim hema hema ji sedî sed raste ku di nava Saka de her sê zaraveyên kurdî jî hebûn. Tişte ji kolaneyên li Karmîr-Blûr de derketî, ku nêzîkî Erîvanê û navenda Urartûyan-Wanê ye, alavên ji salên 600 an BI ne, mîna sîlahên hesinî, mircan û yen din ên derketî wekî yên Iskîtan yên li bakûrê Derya Reş in. Tekiliya Tskîtan bi Ziwiyê/Seqiz- Rojhilatê Kurdistana re jî hebûn. Zêrên li Seqiz derketî bi yên li Elîzavetgrad- Ukranya ve mîna hevbûn. Ev şûrekî dest zêrînî û çakûçek bû. Lê ti§tên li Sibirya derketinî hîn kevntirin. Nivîskarên Swêd dibêjin: Peyva Iskît, gelek êlên ne ji kokekî-nijadekî ne, lê pir bi hêz karekter, nav û navê cîhên Farisî li wan bûn. Arkeologan îşaret kir ku tiştên berê ji Iskîtan de manî, bi çanda deştû ve hevûdû digirt û kevnbûna wan heta 1500 an BI jî dikarin herin.(153'n> Bi rastî, ev dîtinên giranbiha ne û ew dîtinên min piştrast dikin. Tekiliya Saka bi Seqizê ve ew bû, ku beşek Kurd-Lek ji vê herêmê hatibûn bakûr û li wir dijîn ku vana çanda xwe anîn herêmê. Navên li ser coğrafya û li ser ti§tên din jî îşareta desthilatdariya Saka yê li ser komên ji nijadên din e. Çanda wan ê heta sedsala XV an BI jî bi belavbûna dewletên Kurdên ji Anadol û Kurdistanê ve giredayî ye. Wekî Hatî, Xorrî, Mîtanî û yên din ên belav bûne...

Li ser coğrafya Saka Heredot wiha dinivîse: Iskîtên koçber ji çemê Pantîkapes (milekî Dînyeperê) bigre heta ava Gerros (Ava Donets) ê digirin û bi qasî rêya 14 rojan cîh digirin. Ji Tanaîs (Don) bi şûnde êdî Iskît

tunene û gelé yekemîn Saûromat in (bi zimanê Iskîtan dipeyivin). Xaka wan jî ber bi jor rêya 15 rojan dirêj dibe. Li bakûrê wan jî Budîn hene. Ji rêya heft rojan bi şûnde welatê Thyssagetan tê. Gelek in ji kokekî din tên. Li sînorê wan Lûrkaî tên. Li rojhilatê bakûrê wan Iskîtên din hene. Wana ji Iskîtên Şahane veqetiyan bi şûnde, hatin li vir bi cîh bûn.,84 198) Bi vê awayê sê beşên Saka jî derdikevin holê ku ev îşareta sê zarava axifê cüda jî dikin.

Gor lêkolîneyên Kirgizoglû, sedsala VIII an BI, Hûn (Hî Yung-Nu) bûn xwediyê rojhilatê Asya Navîn û li dora çiyayê Xwedê bi cîh bûn. Ji ew ên ku li çiya û zozanan, di nav yekîtiya Saka de dijîn re digotin "Kurd". Li herêma Saka yê li pêne welatan belavbûne û ji bo ewên li wan deran wek koçber dijîn re Kurd dihate gotin.(128'20) Ew tespîteke raste, lê dibe bê zanîn ku di yekîtiya Sakan de kê hebû? Bi dîtina min wek Kurd: şaxe mîna Dimilî-Goran, Lek û Kurmanc hebûn. Li dû van îşaret hene ku Macar û dibe ku Polonî jî tevlî ve yekîtiyê ne. Macar û gelek miletên din di vê demê de li nav û rojhilatê çivayên Uralê li Rûsya dijîn. Bi hatina Hûnan re ew hemû ji cîhên xwe veqetîn.

Gor idea Macaran bixwe jî, êlekê ji wan ber bi Qefqasan û Çemê Aras çûye. Di gelek jêderên dîrokî de jî ewên ku ber bi Korta Şadiyan hatine wek Alan tên binav kirin ku Alan jî beşek ji Kürden Dimilî ne. Iro jî li Dêrsîmê êla Alan heyê ku Kurd in. Gor tespîtên dewleta Tirk êla Alan li Dêrsîmê navça Mazgîrtê di sala 1908 an de 350 eskerên bi çek derdexistine. Nîvgirêdayî dewletê ne.(U6'108) Dîsa li nehiya Dere-Pertek, Nazimiyê û gundên wê yên mîna: Kil, Meşeyolu, Gûdeç, Atlanti, Sınan, Gürbüz û Gomeir^ê Alan (Qeraman, Kalman, Gülen, Zûlfan) dijîn.(116123) Yilmaz Çelîk jî dîtina min piştrast dike: Alanê li Dêrsîmê §axêkî Alanên ji koka Iranî yên li bakûrê derya Kesk, Daxistan û Qirimê dijî ne.(116‘ ,27) Alanên îro li Qefqasya dijîn wek Osetî tên binav kirin.

Eğer giredaneka van hebe, dikare encamên gelek eceb jê derkevin. Alanên li Dêrsîmê di nava Kurdan de heliyane û bıine Kurd; yan jî Osetiyên li Qefqasya bi eslê xwe Kurd in? Gelé bi navê Osetî ye, ku li Qefqasan dijîn ji du élan pêk tên: Yek Alan e ya din jî Dêgor e. Navê Dê-gor balkeşe, wek tê zanîn Gor navekî dinî yê Kurdên Zaza ye û 'dê' jî dayike. Ne dûrê ku Osetiyên zimanê Iranî yên beşa başûre- rojhilat diaxifin Kurdên Dimilî axifên ku heliyane...

Zanyarên Tirk nivîsa yekemîn ya Tirkan wek: "Orhûn Yazitlari / nivîsên Orhûn" didin nasandin. Gorî idea wan, tirkî zimanekî dewlemend û peyvên xwe zêde bûye... Li ser vî kevîrê li Elegeşe yê ku bingeha îdeayên Tirkan e, cara yekemîn alîmên Macar lêkolîn kirin û naveroka wî derxistin holê. Gor wan qebîla Macar ê bi navê Macar Gyarmat tekiliya xwe bi "Min El-Kan Alp Ûrûngû yê Kurd..." re heye.(913) Nivîsa Yenîsey, ji 12 rezan pêk te, kevir 320 cm dirêj û 60 cm pahne. Wek wî 32 kevirên dinê li gorîstanê hene. Ew hemû bi tirkî ne. Ew kevir yê hukumdarê Kurd-Elkan Alp-Ûrûngû ye, ku di sala 650 BÎ de miriyê. Ew kevira ji bo hükümdar hatiye daleqandin û di rêza 8 mîn de wiha tê gotin: " Men Kurt El-Kan Alp Ûrûngû, Altûnlûx-Kesîxîm bantim belde; elim tokuz-Kirk yaşim".(128‘21) Kurdiya wê wiha ye: Ezhnin El-Kan Alp Ûrûngû yê Kurd im. Kemera min a zerini li nava min e, êlên min neh in û salên min çil e. Li vê xelekê Rişvanoglû dibêje: Kurdên Yenîsey, bi êrîşên ji rojhilat hatine re cîhê xwe berdan, ber bi rojava, li kêleka avên mîna Îrtîş û Tobolê bi cîh bûn. Di salên 1581 an de Qazakên-Don cîhên wan îstîla kirin û xwestin ew bikin Xirîstiyan, lê ew bûn Misilman û hê jî ji neviyên wan re "Kurdak" tê gotin.(128_ 22) Bi qasî agahiyên min heye, îro ew hê jî hene lê asîmîlê bûne. Bi vê re giredayî tê gotin ku Tirkan di dîrokê de alfaba Gokturk (Orhûn), Ûygûr, Soxd, Süryanî, Ereb û Kirilî bi kar anîne. Alfaba Ûvgûr di esasê xwe de ji alfaba Iranî ya bi navê Soxd hatibû wergirtin.(148 103) Bi

vî awayî derdikevine holê ku bingeha alfaba wan Iranî ye. Yanê Ûygûrên Tirk alfaba xwe ji miletekî Arranî girtibûn û navê wê jî Soxd e. Ji bo ku di lîteratûra Tirkan de Kurd nîn in, hema hema ji sedî sed e ku ew alfabeyeka Kurdî ye. Dîsa peyva Soxd bi Saga/Saka ve jî gelek nêzîkî hevûdu ye. Kî dizane ku Soxd ne alfaba Sakayên Kurd e?

Gor Seferoglû, navê êla li ser kevirê Orhûn tê qal kirin Kurd bû. Di dêstpêka sedsala VII an de li herêma Çême Yenîsey, kraltiyeka ji "Oxûzên Şeş"

re dran hebû. Ew Mîrîtiya pir bi hêz ji alî êlêka Sakayê bi navê "Kurd" ve hatibû damezirandin. Alfaba Gokturkan bikar dianîn. Kevirê Yenîsey û nivîsên li ser 32 goristanan bi vê alfabê hatibûn nivîsîn.(91~7) Li vir jî nivîskar bi xwe re dikevê nakokiyê û qebul dike ku ew mîrîtiya Kurdan bû û ew nivîsa li kevir jî ji alî Kurdan ve hatiye nivîsîn. Nivîskarê rojnama Radikale İsmet Ber kan dibêje: "Bi Serokkomar Ozal û Demirel re gelek caran çûm dewletên Tirkî. Gelek zana, lêkolîner 0 bavên dîroka Tirk jî bi me re diçûn. Me li Moxolîstanê koka tirkî "Yazita Orhûn" û heykele Kul Tigin jî ziyaret kir bi şûnde guftûgoyên me li ser nijad û koka Tirk hîn zêde germ bûn. Dîsa di yekê ji van de Prof. Yûsûf Halaçoglû û gelek turkolog û arkeolog hebûn ku di encama guftûgoyên me de herkes qanî bû ku nijadeke bi navê Tirk tunebû balam tirkî hebû.. ."(2007.03.01 -Özgür Politika). Ew yeka jî dibe îtîrafa derewên dîroka fermî ya Tirkan.

Di navbera salên 898-902 an de, Oxûzan bi mutefîqên xwe Xezeran ve tevhev erîşî Peçenekan kirin. Piraniyan Peçenekan barkirin bakûrê Derya Reş û Macaran ji wir derxistin û bûn hakimê wê deşteT31"60* Xezer ji nijadeka Tirk- Moxol in, lê îro ew ên li Afganîstanê bi zimanê Derî diaxifin. Li vir nijada Peçenekan jî cîhê lêkolînê ye; li gorî Tirkan ew Tirk in, lê ne wiha ye. Macaran doré salên 800 an ji Vladî Qafkas koç kirine û di nava van de Kurd jî hebûne. F. Echat dibêje: Heft êlên Macar hene. Ji yek ji wan

re Kurt-Gyarmat dihate gotin ku ji du qebîlan pêk ciihat. Li bakûrê Tûna û li Erdelê Sekê dijîn û di nava van de êleka bi navê Kurdan jê heye. Di belgeyên dîrokî yên Macar de heta salên 1138 û 1329 an de navê Kurdan wek Kurtu (Kurt, Kurtu) derbas dibû. Di yên 1156 an de Kurt (Kirth û Kyurta) derbas dibe.

Ascherson jî qala tiştekî nêzîkî vê dike. Dibêje; Ji hezar salî zêdetir, di navbera 700 BÎ û 300 PI de deşta Pontûs û be§êkî mezin ê rojhilatê başûre Ewrûpa di destê Iraniyan de bû. Xelkê ku Grekan jê re digote "Syter-Iskît" jî ji Asya Navîn hatin û di salên 700-600 BÎ gîhîştin Derya Reş. 400 salî şûnde (200 BÎ-Ş), wexta Îskîtan bakûrê Derya Reş kirin bin kontrola xwe, êlên din ên bi zimanî Iranî deng dikirin bi erabên xwe yên şer û bi komên hespên xwe hatin. Vana ji stepên derdora Derya Kesk û Volga û xwe kirin herêma navbera başûre Don. Grek û Îskîtan dîtin ku vana ne Îskît in û ji van re gotin "Sarmater" (Sarmatiska Alaner /Osetîn/ Indo-Iransk). Vana heta Derya Reş erd ji dest Îskîtan girtin û ew ber bi platoyên Don ve ajotin. Li wir 500 salan man, heta ku Gotî û Hûn hatin. PÎ 300 an de vana xwe ber bi rojava direj kirin.(7f,) Tarîxa nivîsa li Elegeşê bi tarîxa Kurdan ya bi Îskîtan re li Anadol û îranê hati dîtin hevdû digire. Vê tekiliyê N. Sevgen wiha tîne ziman: Kurd an ji koka Îskîtan in, an jî bi wan re bi hev re hatine Anadolê.(15(M1) Herdû jî rast in, lê ne hemû Kurd, beşêk ji Kurdan bi Îskîtan ve yek in.

Sadî Koçaş dibêje: Kurd li rojavayê gola Baykal, dora çemê Yenisey û di zozanên li navbera çiyayên Altay û Sayan de dijiyan. Ev ji nivîsa li ser kevirê Elegeş hatiye fêhm kirin ku ji sedî sed dewleta Kurdên Elkan (îlhan) ê PÎ di sedsala VII de li wir hebûye.(4y)

1300 sal beri nlha, nivîsa Elegeş a bi alfaba Gokturkan hatî nivlsf n a aidé Turken Kurd ë li keviya çemê Elegeş.

Nivîsa Elegeş

Hinek jinivîskaiênTirk dibêjin evv nivîsa li ser kevirê Elegeş şîn e. Hinek jî vê dîtinê qebûl nakin û dibêjin, serokê Kurd dema derbasî ser text dibe, ji gel re axaftinekê dike û dibêje: "Ela Elkan Kurdên qehreman! dema min tûrikê tiran girêda ez xwediyê neh bajaran bum..." Seven jî dibêje: Di nivîsên Yenîsey nêza 8 an de: "Men Kurt Ilhanî Elkan Alp-Urûngû, altunbug keşogîn bantim belde, êl im dokuz-kirk yaşim" tê nivîsîn û di wir de vekirî xuyaye ku li Yenîseyê bi navê Kurd zendekî Tirk î dijî ye. Zanyarê Macar, ji êlên Macar Kurd-Gyarmat ê bi ew qebîla li Yenîseye va yek dibinin. Di sedsala VI an de ewna bi Tirken Avar re û bi nava Seke-ler de hatin keviyên Tûna. Dîrokzanê

Bizans Constantînûs VI Porphirogenetus (780-797) dema navê cihan dini vise wek Kurty-Germatu dinivîse.(150'5) Aydin Tanerî jî dibêje: Navê Kurd cara yekemin di pirtûkên Gokturkên li Elegeş derbas dibe. Di nivîsa Elegeş te em wan dixwînin: Ez xanê waletê Kurd Alp Urûngû, tûrikê xwe yê zerini li nava xwe girêda, welatê min... Li vir qala êlêka Kurd tê kirin... Zanyarên Macar, êla Macaran ya bi navê Kurtgyarmata kevn bi navê êla Kurdê Elegeş ve digihînin hev. Heta dibêjin, di nava vê qebîla Macar de, qebîla Kurdê li Yenîseyê heyê.(89' 1!) Ew êlên Kurdên ku navê xwe derbas dibin heta Çek dirêj dibe. Li Slovakya bi Macaran re gelek Tirk (wek Kurd bixwîne-Ş) bi cîh bûn. Koka bi navê Kabare bi navê Kazarlar, Kurt, Kesik hwd.(8911) Ji van jêderan vekirî tê fêhm kirin, ku dema Macar ber bi rojava çûn beşek Kurd ji bi wan re çûne. Wekî me gotî Alan hatin bakurê Kurdistanê û li herêma Dêrsîmê bi cîh bûn, ji sedî sed beşekî ji wan, yanê Kurdên kirmanckî axif bi Macaran çûn û di nava wan de heliyan.

• ô

KELET EUROPA A IX. SZÂZA06AN ÉS

A MAGYAROK KORABBI SZÀLLÂSHELYEI

2u 000 000

Ulm

Koça Macaran ya ber bi rojava û Alanên hatine Kurdistanê

Eğer mirov bala xwe baş bide nivîsa li ser kevirê Orhûn (Talas yaziti), tê dîtin ku vekirî qala êla Kurdê Qereçorî tê kirin. Qereçor bi Reşiyan ve yek in û heta dema dereng li Qefqasya jiyan. Niha jî li Kolik û Xorasnê hene. Tenê ew nivîsa îspata herîmezüre ku ew Kurd in, ne Tirk. Ji bo ku lêkolîner, dîrokzanên Kurd ew nivîsa bi kûrahî nekolîne, îdeayên nûserên Tirk bê guman pejirandine û vê yekê rê li ber neheqiyên mezin vekiriye. Ji aliyê din ve Kurd bê dewlet in, saziyên wan ên mafê dîrokî biparêzin nîn in û ew jî bûye sebeb ku Tirkan çawa xwestiye bi wî awayî dîrok nivîsîne. Li ser wî esasî, belgên dîrokî tên xirab kirin û bi zanabûn şaş tên şirovekirin. Ew yeka niha aşkere bû! Lêkolînêren

Tirk jî vê dizanin û naxwazin aşkere bikin. Aşkere kirin ji bo wan jî ne hêsan e, lewra heta niha bi derewan dîrokêk hatiye avakirin û ew bi vî awayî ketiye hişen mirovan. Xirab kirina vê kes nikarê bide ber çavan. Vê yekê ismet Berkan vekirî dide dest nişan kirin û dibêje: "Niqta me bi Kazak û Kirgizan ve digihîne hev tenê zi man bû. Wek mînak di van serlêdanan de ez fêr bûm, ku di serî de Nivîsên Orhûn, gelek metnên dîrokî ji tirkî re şaş hatibim wergerandin. Rastkirina şaşitiye pir zahmete." Nivîsa li ser kevir wiha ye:

Otuz oxlanin vefakar arkadaşlari maymun yilinin onaltisinda

Adim Kara Çûr, yaylaximiza kar yaxdi

Alti kabilesi....bîr kuçûk kiz kardeşi (dul?) kalmiş

Kar Çûr, atim kula (renginde) kar yaylaximiz

Kar Çûr ... dixer kardeşlerinde ayrilmiş

Oxlûnun adi Tuçayan, oglûnun adi Kar Çûr

Oxlûnun adi Sagu (m-ısıy

Kurdiya vê wiha ye:

Di şazde meha Meymun de, hevalên fedakar ên sîh lawikan Navê min Qara Çûre, li zozana me berfbcırî Şeş qebilên xwe. ..xwîşkeka xwe ya biçûk (bî?) ma ye Qar Çûr, hespî mini qûlê, zozana me bi berfe Qar Çûr....ji birayên xwe yen din veqetiya ye Naiê lawê xwe Tûçayan, navê lawê xwe Kar Çûr Naie lawê xwe Sagû...

Di vê abide de gelek niqtên vekirî hatine diyar kirin: Yek ewe, îro koma wek Qereçorî têyî zanîn navê xwe ji wî serokî girtiye. Hîna jî ew koma heye û bi Reşiyan ve pismamên hev in, lê mixabin gelek jî heliyan û bûn Ermen û Azerî... Niqta din ê girîng jî, vekirî tê nivîsîn ku ew ji birayên xwe yên din veqetiye. Navê kurê wî Sagu jî gelek girîng e. Bi wî awayî derdikeve holê ku ew êl yan jî federasyon-êla ku alîmên Macar qal dikin Kurdên Qereçor-Reşî ne. Bi vê yekê re giredayî di nava zimanê Reşiyen li Anadolê de jî şopa Macaran tê dîtin.

Zimanê me û yên Macaran jî jihev peyv girtine: Wek hejmarên ji deha bi şûn de têyî: Yanî, yanzdeh-devyek(ll), donzdeh-devdudu(12)... tenê Kurdên li Anadolê û hinekên rojavayê Kurdistan vê sîstema dervayê gramatîka Hind- Ewrûpî (Arranî) bi kar tinîn. Di zimanê Kurdî de, ya rast ew e ku bibêje yanzdeh û donzdeh. Lê Kurdên Anadolê ew ji ku girtibûn? Di zimanê macarî û tirkî de bere deh, piştre yek yan jî dudu tê xwendin yanî wek forma Kurdên me Anadolê. Ji vir ew encama derkeve ku ew guhartina di zimanê me pêk hati de, kaniya xwe ji vir digire. Wekî din jî tenê Kurdên Anadolê ji "patatês"/ kartol re dibêjin kompîr; Macar jî

dibêjin kompîr. Li navenda Anadolê dibêjin "riz", di kurdî de pirince û di Macarî de jî riz e. Di wî alî de jî bandor li ser hev

çêk irine ku e w jî bi tekili û cîran ti ya wan ve gir edayı ye.

Seferoglû dibêje: Dema Macar li dora çême Don (Dentû-Mogyerîa) û di bin serokatiya "Lebedî" de bun (îhtîmaleke mezine ku ew bi leqaba "Kundû" dihate nasîn);ji rojhilat vebidrîşenPeçenekanhatinherema Dînyeper, Dînyester û Prut. Ji heft élan pêk dihatin. Ewana: Tarjan, Yene-Gûr, Gyarmat (navestî), Kêr, Keszî, Kurd bun. Kurde li axa Çekoslowakya de bi Macaran re bi hev re bi cih brine. Mile bi nave Kazak, Kurd, Kesik e, di bin navî Kabar (Kalan?) tên nasandin. Li Qirimê jî gündeki bi navê Kürdi heye û vana Kürden Macar bun (ji Josef Blaxkovîç girtiye).(9M/13) Tro jî li Dersime êlên bi navê Kalan hene ku ti gumana min nine ew beşekî Kabaran in. Cîhên ku îro ji Kürden li Macaristan mane ev in: Baç, Borsod, Heveş, Solhok, Komaron, Nograd, Nyîtra, Pojonî, Temeş ê.(9114> Konstantin Porfîrogenetos di sala 950 an de, di berhema xwe ya bi navê "Dewlet" de dibêje: 120 sal berê li bakûrê Derya Reş Macar dijin. Gor raporên rahîban ew heft êl bûn û ya herî bi hêz zenda Kurd bûn.(I2S3b) Bi vî awayî hemû jêder destnîşan dikin ku komek Kurdên bi hejmarek zedê di nava van Macaran de hebûne. Lê hêjaye ku mirov hin kûrtir vê bikole û bawer dikim gelek noqtên balkbş ên din ê derkevin holê.

Yek ji îdeologên dîroka fermî ya Tirk Seferoglû dîsa dibêje: Ilimciarên Macar, bi qasî li ser wata navê Tirkan sekinin li ser navê Kurdan jî sekinin, lewra; ew bi xwe jî ji Asya Navîn in û li welatê wan ne kêm be jî "Kurd" û şopa gelek berên Tirkan (naxwaze bêje Kurd-Ş) hene. Gor Macaran wata Kurd: Berfa li ser çiya mayi û zû bi zû nahelî ye.(9M) Di vê babetê de nivîskar dixwaze Kurdan wek Tirk nişan bide. Nivîskarên Macar aşkere li şopa Kurdan diğerin, lê nivîskarê Tirk hewl dide ku vê yekê wek Tirkan nişan bide. Ji bo, ku beşek Kurd ji Asya Navîn hatiye Macaristan, Kurdistan

û Anadolê. Yan jî demeke li Asya jiyaye. Gor mentalîta wan her kesê ji rojhilat yan jî ji Asya bêne Tirk e.

Rişvanoglû jî aliyêkî din ê dîrokî dide nişan: Li Tannu-Tuva, beri hukumdariya Gokturkên duyemîn (681 BI) Kurdên koçber ên bi keriyên pêz û Yilkiyan (?) debera xwe dikirin, bi "Şeş Oxûzan" re cîran bûn. Ew Kurdên Yenîsey 650 salan BT xwedî dewletek EL-KAN bûn. Wê demê Gokturkên rojhilat di dema 620-681 an BI de girêdayî împaratoriya Çîn bûn.<128'21) Ew El- Kan ê ku nav derbas dibî nêzîkî peyva Xelikan/Xelkan ê ne, ne dure ku heman êl be, lewra heta roja îro Xelikî girêdayî çanda xwe ne, ew şopa çandê bê guman ji dîroka wan ê bi nav û deng tê. Bi vê demê re girêdayî di nava Kurdên li Anadoliya Navîn de, berê (1965) çirokek balkeş hebû; niha kes nizane. Orîjinala çirokê tam nizanim lê dema ez zarok bûm pîra min Ela Mamî Tozê ji min re qaldikir. Çîrok bi kurtî wiha ye: "Kalên wan bi dujminekî bejn qût, rû spî yen naşibin mirovan û loek mirovên dinyeka din re şer dikir ine. Ew mir ovên ecep bi kustinê teva nedibûne. Ji sibê de beta êvarê wan şer dikiriye û sûra wanê dixelandinê; lê sibê dema Kurd vedigerine qada şer ditîne ku ew sûrên xelandinî dîsa çêkirine û şervanen wan li cîhê xwe ne. " Min di nava rûpelên dîrokê de koka vê çirokê peyda nekir. Gelo ew miletê ku Kurdan bi vê re şer dikir Çini an Tirk bûn? Eger Çînî bin

gelo sûra Çîn li hember Kurdan hate çêkirin?

Wekî piraniya nûserên fermî yen dewleta Tirk, Seferoglû jî dixwaze rojê bi heriyê sîwax bike, lê xwe aşkere dike; dibêje: Di ber yan jî hema di dû Sakan de ew êla ku navê xwe li ser kevirê Elegeş hatî nîvîsin (Elxan/Xelka yan jî Qereçor), hate başûre çiyayên Zagrosan (Iran), zimanê tirkî wenda kirin, ji farisî û erebî peyv kirin nava zimanê xwe.(91'9) Heta demên dawî Ideologen Tirk digotin kurdî zimanekîji zimanê cîrançêbûye, ku ew dîtin jîji heman mentalité derketiye. Yanê dixwazê bibêje Tirkên li Yenîsey

hatin başûre Kurdistan û bûn Kurd. Heman nivîskar dibêje: ew êla Kurd a li keviya Yenîsey hetanî sedsala VI an bawerî bi ola ezman dianîn (Zerdeştî-Ş). Di 1581-1582 an de misilmanan tekoşîn bi ser xistin û wan Kürdana jî misilmantî qebûl kirin. Navê wan ê 400 sal in têyî nasîn "Kurdak" bû. Sînorên dewleta Saka heta çiyayê Çîn ê bi navê Hapot, Tûna, Misir û Filîstîn diçû.(9l'9) Li wir jî vekirî xuya dike ku ew hatine Zagrosan û zimanê wan jî kurdî ye. Hatina wan ê ba§ûrê Zagrosan jî balkê§e. Gelo kîjan Kurd bûn? Kurdên Lek bûn yan jî Kurdên Celalî bûn? Em dizanin ku heta derengî Celalî (Reşî-Qereçor) li vê herêmê bûn û piştre belav bûn. Kurdên îro li dora Mere§ê dijîn bi piranî ji wê herêmê hatine.

Bê guman li ser Saka dîtina bavé dîroka nivîskî Heredot girîng in, ew dibêje: Alban in (Alan?Ş) li Şîrva^ berdewamiya koka hukumdarê bi navê Afrasivap (Kurdên Meletî di sala 1650 de digotin ew bapîrên me ne) in. Heta sala 625 a BI de hukumdarê Saka bû ku di dema wî de wana 28 salan desthilatdariya Asya kirin. Afrasiyap bû hukumdarê 26 êlên Alan. Alana pez xwedî dikirin û koçber bûn. Alan ji cîranên xwe yên rojava Iserên ku bavé Gurciyan in xwedî artê§eka bi hêztir bûn. Wana bi Kaspiyên desthiladarê Derya Kesk ve ji kokekî dihatin. Mirov li ser vê bingehê dikarê bibêje ku Kaspî-Alan û Zaza yekin û yên navê xwe danî vî Behrî jî Kurdên Dimilî axifin. 60 hezar peya û 12 hezar jî siwarî kuveta xwe hebûn. Wê demê, reqîbê Roma yê herî mezin Arsakiyan bûn. Koma wan a mezin li Xorasan, Iraq û Iranê bû ku paytextê xwe Hemedan e. Arsakiyên biçûk jî, ji Kaspîn bigre heta Kizilirmak, Azerbeycan, Qefqas, Gürcistan û rojhilatê Firat desthilatdar bûn. Paytextên xwe jî di navbera Agirî, Rêvan û Qersê da bû ku li wir dew'leteka pê§ çekiribûn. Ev dewleta jî ji alî Pers-Sasaniyan ve hatê rûxandin.

J

Koçaş wana wek Kurdên Kur-Aras bi nav dike û dibêje, ji sala 645 an ve, ku fetîha îslam hatibû herêmê heta dema Şerafname hat nivîsandin, yanî 1597 an li welatê Aras-Kur-Aran jiyan. Neviyên Saka ji sedî sed rast e ku koçberên Kurd in. Belazûrî, di dema fetîhên îslamê yên salên 645 an de qala Kurdên bi navê Balasacanê ku li Qerebaxê dijîn jî dike... Nav gelek balke§ê ku dikare bê wata Saka yên bilind... Mukaddesî jî di sala 961 an de berhemekê dinivîsîne û di w'ir de dibêje: Li Daxistanê, li deriyê hesin de Kurd dijîn, êlên Kurdên ku li Debilê (Divin) dijîn di malên ji kevir û kerpîçan de ne... Gorî jêderên Îslamî, Kurd ji salên 800 an şûnde li Daxistan bûn desthilatdar û yên ku bi Macaran ve çûn dora Tûna bi vanên li Qefqasan ve ji heman kokî ne.(49)

Li jor jî min nivîsîbû ku ew heman kok e. Dr. Zorab, ku li ser lêkolîneyên xwe 'di wêjeya Macaran de Kurd', tê nasîn, di kovara Hîwa hj. 33 an de dibêje: 1100 sal in ku gelé Macar li Awrûpa dijî. Di sedsala IX an de komên Macar ji Asya, bi rêva Qefqas û Rûsiyê tên Awrûpa. Di sala 1001 an de kralê Macaran ola Xaçparêziyê dipejirîne. Dibêjin ku berê bi Kurdan ve di heman baweriye de bûn.

Heredot qala bûyerêka din jî dike, lê çiqas rastê ew nayê zanîn: Tskîtan erîşî Medan kiribû, rê li gelek şeran vekiribûn û 28 salan li Medya hükümdarı ajotibûn. Piştî ew vegerîn welatê xwe artê§ekê riya wan girt. Artöşeka ne hêz kêm bû. Jinên Iskîtan ditin ku mêren wan venegerîn û bi koleyên xwe re ketibûn nav tekiliyan û zarok ji wan çêbûbûn. Iskît koçber in, erdê najon. Bi ajelan re mijûl in. Şîr didoşin, berdidin fiçiyan û bi kolên xwe hatinî korkirin didin kutandin; şîre li jor mayî heytinin ku gor wan şîre herî baş ewe.(84093) Heta demên dereng di nava Kurdên li Anadoliya Navîn de jî ew fiçî hebûn û pê rûnê kayî dikirin. Mast dikirin fiçiyan û dikutan, ewe li jor mayî rûne, yê din jî dew e. Lê eger ew şîr be encam tê guhartin... Ew zarokên li kolanan hatine dinê, ji çiyayên Qirim (Tauris)

heta Derya Azak (Palus-Maîotîs) erx kolan û bi Iskîtan re şer kirin.(84~193) Eger ew serpêhatiya rast be, di nava Sakan de kêm be jî, mirov tevlîbûna nijadên din jî dibîne. Eger mirov di vê niqtê de kûr bifikirê dibîne, ku ji alî fîzyolojî ve di navbera Macar û Kurdan de hevbeşiyek jî heye... Serpêhatiyeka din jî heye ku wiha tê gotin: Piştî şere Thermodon, Amazonên girtî kirin sê keştiyan, derketin nava deryayê. Di deryayê de Amazonan mêr hemû kuştin û bûn xwedî keştiyan lê nedizanîn vana bi rêva bibin û tesedûf hatin nav axa Iskîtên Azad. Xortên Iskît ew nîvro digirtin û vê re diman. Paşe bihevre zewicîn, jinan xort heynan, di Don re derbas kirin û bi riya sê rojan bi şunde hatin welatê xwe.<84'223)

Wekî dîroknûs radigîhînin di têkiliya Saka û Medan de jî cama şer carna hevkarî bi pêşdikeve, di beşa Medan de jî min nivîsandibû, ku di serdema Diyako de li hember Asûr hevkariya wan xuya dike. Lê dema Saka di sala 625 an BI de ketin dû Kîmmeran jî em şere Med û Sakan dibînin. Bi dîtina min, di navbera dîroknûsan de ji bo vê demê nakokî hene û zelal kirin jî karê dîroknasan e. Piştî xanewa Medan hilweşî û xanewa Pars hate ser text, di nava Saka û wan de aştî jî holê radibe û bi piranî bihevre şer dikin. Yek ji hêza desthilatdariya Farisan qebûl nekirî jî ew beşa Kurda ye. Diyar e, ku ew ji Kurdistanê jî bi temamî derketine û li bakûrê Derya Reş û Asya belav bûne. Gor bîr û baweriya min ew demeka girînge ji bo Kurdên îro li dervayê welat dijîn. Eger têne ew beş bê lêkolîn kirin, bawerim gelek niqtên tari dê bên zelal kirin. Ji ber stûxwarnekirina Sakan kral Dara (BI 521-486) piştî Babîl heyna, erîşî ser Saka kir. Di vir de nayê wê watê ku beşên din ê Kurd ne bi Dara re bûn. Ji alî din ve, Asya pir pêşketî bû; di nava dewlemendiyê de bû û nüfûsa wê pir bû.(84 193) Lewra di nivîsên Dara û kurê wî Xerxes (Husrev) de navê Saka wek Tîgraxauda yanê kesên kumên xwe tûj, dihate gotin.(94‘292) Bê gu man ew

J i ber vê asîbûyîn, girêdana çand, nete w û ola xwe ew wek Kurd jiyan û ji Pers re jî serî dananın. Bi vê taybetmendiya xwe ya serî netewînî jî mohra xwe li dîrokê dan. Ji ber wan sedemên ku gelek dîrokzan dibêjin, piştî Medan, mirasa Aryen a duyemîn a mezin ji alî Saka-Sarmato-Alan an ve ma û bandoreka mezin ji xwe bi şûnde hîşt.(154'81) Beşkirina mîna Saka, Sarmat û Alan jî watedar e; bi dîtina min ew hersé zarava axifên kurdî nişan didin. Dîsa Saka gelek nav ji xwe bi şûnde hîştine. Wek mînak: Saqiz, Saka wand, Sarmî, Ardalan, Memê Alan ji wan de mane. Ji Aryenê Sagartyan bi grubên mezin li navbera Hewler û Nîhawendê bi cîh bûn. Dîroknivîsê Yûnan-Roma Flavius Arrian dinivîse ku di sala 134 an PI de Kurdistan du caran ji alî Alanan ve hate dagirkirin.(154‘81) Iro em baş nizanin ku ew Sagartyana kalên Kurmancên Reşî-Qereçor (Celalî) in an na? Ew îhtîmala heye. Lê dibe ku zarava axifê din ên mîna Leran û Dimiliyan jî bin. Doç. Yilmazçelik, hewl dide wek Tirk nîşan bide jî niqteyeka pir girîng dest nîşan dike: Zazayê giredayî Sakan yên bi navê Sabûr ku proto-Tirk in, ji Asya Navîn veqetiyane hatine li hawza yên Dîclê û Firat bi cîh bûn. Pêne hezar sal BI ji Asya Navîn veqetiyan û li Anadolê bi cîh bûn.(116'5) Ji vir em dizanin ku Kurdên Dimilî ji sedî sed giredayî Sakan e û wê demê navê wan Sabûr bûye. Sabûr jî ji alî nûseran ve wek: Sarmet -Sarmatya, Saûromatên cûda têne nivîsîn.

Aschersonê bi salan li bakûrê Derya Reş lêkolîn kirî jî agahiyan dide: 400 sal BT êlên Saka (jî gelé Hînd-Iranî ne) û kesên li Mezopotamya rûdinîştinî yên hov li serê Atenê bûn bela û dijberê Atenê bûn. Lê doré salên 200 an BÎ de, rewşa Sakan ber bi xeravbûnê çû. Sedema vê yekê jî Sarmet bûn. Sarmetê di stêpen navbera çêmê Don û Volga de nîştecîh, ku ew jî xelkekî Hînd-Ewrûpî bûn û bi sîstema élan dijîn. Dema bi hemû hêza xwe ber bi rojava ketin tevgere rewşa Sakan xjrav kirin. Tişten din ê balkeş jî ev e, ku

di gorên jinên Sarmet de şûr, tîr û alavên dinê derketi bûn. Kraliçe jî li dora çemê Don hatibû veşartin. Li ser sûsên wê deîbadetxanê, şato û heykelekî li Iran wek sembol dihatî nasîn jî hebûn. Ji zêr fîgurên mirov û ajelan hebûn.(7h) Ji materyalên derketî jî xuyaye ku ew xelkekî pro-Kurd in, Wekî min li jor jî nivîsî Sarmet îhtîmaleka pir mezine ku Kurdên Zaza bin. Ewên li Macar îro asîmîle bûne û yên He redot qal dike li Tûna û Enet ê jî ew in. Niqteyeka din jî heye ku pêwîste mirov binivîse, her çiqas îdeayek be jî, gor dîtina min, xelkên li Qefqasê ji koka Arî, Zaza û Lek ên ku asîmîlê bûne ne... Wek mînak Asetî/Osetî îro wek xelkekî cûda xuya dikin, lê bi dîtina min ew êlên Zaza yên ku hatine asîmîle kirin in...

Yek ji wan gelé li Qefqasan dijî jî Çerkez in. Bi dehan salan bi Kurdan re şer û cîrantî kirine. Di pirtûka li ser dîroka wan hatî nivîsî de wiha tê nivîsîn: Osetî û Lak-an ji grubên Çerkezan têne qebûl kirinê û zimanê Hînt-Ewrûpa bi kar tînin.(62) Gor wan Lak ji koma Çerkezan tê ne; di vir de pirsgirêkekê heye: gelo Lak û Lek yek e yan jî xelkek e? Lek wek em dizanin li coxrafyeka pir fîreh belav bûne: Li her qûncikê Anadolê, li başûrû Derya Kesk, Loristan, Cezayir, Kurdistan û Anadoliya Navîn... Li ser vê bingehê, mirov dikare bêje ku yan

ew têza ne raste, yan jî Çerkez ji Kürden Lor in! Lê Lek eğer Çerkez biyana wê çaxê di nava Kurmancan de hînbûna wane Lorî ne mümkün bû... Em ji wan berdewam bikin: Tê qebîil kirin ku Osetiyan nûnertiya qewma di dîroke de ya bi nav deng û mezin Alan an dikirine. Asetî Alanên dawî ne, yanê ê baqî ne. Alan, 100 sal BÎ hatin Qefqasya û ji ber zordariya Hûnan di salên 370-375 an PI de ber bi rojava koç kirin. Zimanê Alanan koka xwe ji Sarmetanê ku ji beşa Iranı yê rojhilat digirin. Paytextê Osetiyên başûr Sinvalî bû ku giredayî Gurcîstanê ye.(62) Me berê jî gotibû ku Alan Zaza ne û îro jî li Dêrsîmê dijîn. Ve demê mirov dikare bibêje ku Kurdên Dimilî û Lek bi hev re di bin konfedera- syonekê de dijîn? Ew yeka jî mumkune

lê dibe ku nivîskarên xwedî vê îdeayê jî di nava nakokî û şaşîtiyan de bin. Mumkune ku ew ferqa Dimilî û Lek an jî nizanine. Lê çi dibe bila bibe di vir de nêzîkatiyeka Alan, Ler-Lek, Zaza, Asetî û Sarmetanê heye. Sarmet û Lek dikare bibe grûbek (Lor); Zaza, Alan, Asetî jî koma Dimilî diaxif û zimanê herdûyan jî ji xwe grûbek e...

Ew xelkê ku Kurd ji cîhê wan î li Asya veguhurandî Hûn in. Gor dîrok nivîsarên Tirk wexta li Asya dewleta Hûn a Bakûr hilweşiya bi şûnde, Hûn li destpêkê hatin herêma gola Aral, piştre hatin navbera Volga û Ural; di nava sedsala IV de dîsa ber bi rojava koçberbûn. Vana, xaka Alana ye di navbera Aral û Xezer de, ji dest girtin.(148'79) Di vê demê de Alan li dora Gola Aral û derya Kesk de dijîn, ku ew girîng e; yanê Dimilî di salên 370 an PI de li vê heiême bûne. Di dema Alp Arslan de jî hinek mayînde Kurd li rojhilatê Derya Kesk tên dîtin ku emê pa§ê li ser wan rawestin. Berî vê pêwîste em qala pirtûka xanedanê Hîvê Ebûlgazî Bahadir Xan bikin. Di sala 1641 an de, di pirtûka bi navê "Secereî Terakîma" de, dinivîse ku: Li Ulu Balkan û Qiçî Balkan Turkmenê Enşarî (wek Kurdên Ensarî bixwîne) dijîn û di nava wan de zendekî Kurdî bi navê Xizir Elî dide nasandin. Yekê jî, em kurmancan, bi Tirk, Goran û Xeleçan ve tevhev dibînin. Wek tê zanîn ji 24 êlên Oxûzan du heb ji Xeleçan pêk hatine.(128'25) Hebûna Kurdan ya li wir bi vî awî jî tê îspatkirin, lê aliyê ku ew pirtûk bi me dide xuyakirin yek jî ewe, ku qala Xizir heye. Wek tê zanîn ew Kurdên li derva, bi taybetî jî yên Dêrsîmê bi xizir radibin û bi xizir rûdinin ku ew ji alî olî ve jî girîng e. Ew Kurdên (Alan) ji vê herêmê yên ku ji ber Hûnan reviyane, ji çiyayên Qefqasan derbasbûn û ber bi bakûrê Kurdistanê hatin. Heta mirov dikare vê yekê jî bibêje ku Hûnên ku heta Çûqûrovê hatine, mumkune ketibin dû şopa Alanan. Nivîskarê Tirk Kara wiha berdewam dike: Hûn di bin fermandariya Balamîr de di sala 375 an de ber bi Ewrûpa çûn. Di heman demê de li bakûrê Derya Reş qewmên Germenên mîna

Gotî, Gepît, Vandal dijîn. Li heman herêman qewmen Germenên rojhilat ên mîna Slav û hinekê ji kokê Iranî dijîn. Bi vî awd Hûnan ew qewmanan derbasî tevgerê kirin û yekî yek ji cîhe xwe avêt.(148'79) Di cîh guhartina wan qewman de jî xuyaye, ku ew miletên ji Asya hatine di dîroka mirovahiyê de bûne sedem ku gelek xelk ji cîhê xwe veqetin û belav bibin.

Di filma bi navê "Atîlla-Lehengê Gelé Şervan" a ji alî Gerard Bûtler,

Sîmmone Jade Mackinnon (navê di film de: N'Kara ye) û di rejîsoriya Jane Robinson de hatî çêkirin de Hûn, wekî Sakan xuyadikin û wekî wan dijîn. Eger çîroka wî filmi rast be, we demê mirov dikare bibêje ku Hûn yek ji zendê Saka ye. Di alî kine, stîla jiyanê, koçberî, xanî-konan de û di alî yasayên civakî de Hûn bi temamî wek Saka ne. Heta N'Kara ku navê wê jî balkeşe, baweriyê bi agir tine; koda ku tê de agir vêdixe bi alavên baweriya Saka vê ku ji kolîneyan derketî ve yek e...

Li ser hatina Alanan ya ji Asya bê pejirandin, belga ku li günde Şarik hatî ditin gelek girîng e. Di secera li günde Şarik de hatî ditin de dinivîse ku Alan ji herêma Buxdan/Burkent hatine Kurdistanê. Deguîgnes dibêje, li Turkîstanê bajarêkî bi navê Alanî heye. Ji deştân Sarmatya heta Hindistan û li çiyayên keviyê çême Ganî ew belav dibin û ji wan re di wata çiyayî de Alan tê gotin.(12fU|54) Ji van ditin û belgana jî diyar e, ku Alan y an jî bi navekî din Kurdên Dimili yê wê demê li Asya bûne û yekbûna Zaza bi Sarmatan ve li vir jî tê testîq kirin. Li bakûrê Kurdistanê li herêma Dêrsîmê jî gelek gund û cîh hene ku bi Alan hafine binav kirin. Heta navê gundê bavé Seyîd Riza jî Alan e.

Dema Iskenderê Mekadonî êrîçî welatê Med û Persan kir, tê dîtin ku Saka dîsa li cem hemwelatiyê xwe ne. Ew jî qerektereka Kurdan ya ku dema hemwelatiyê wan di tengasiyê de bin, her tiştekî ji bîr dikin û dibezin alîkariya wan dikin. Ji bo vê demê nivîskar Aslier wiha dinivîse: Di sala 331 an BI de, di navbera Iskenderê Mekedonî û Dara de şer çêdibûn. Di şere

vê salé yê li Babîlê pêk hatî de, nêzîkî 245 hezar eskerên Fers hebûn ku ji wana 45 hezar siwarî bûn. Di nava van siwariyan de, bi taybetî jî Saka û Bextiyarî hebûn, ji de§tên Asya Navîn hatibûn û xelk gelek ji wan ditirsî.(1S5"42) Ji vê jêderê jî em dîsa dibinîn ku vê demê Bextiyarî yê Lor jî li Asya bû ne. Stîla jiyana Bextiyarî û Kurdên îro li Anadol û dervayê welat gelek dişibine hevûdû. Heta mirov dikare bibêje ku di alî kinc û rengên kincan de jî gelek nêzîkî hev in. Carna mirov nikare ji hev veqetîne. Şervaniya wan li vir jî deng daye. Lê serhildana Bextiyariyan li hemberî kralê Persan balkê§ e; serokê eyelata Bextiyarî Besso

li hember Dara serî hilda û ew kuşt. İskender jî Besso kuşt.(183'45) Ne dûre ku li ser taktîka şer lihev nekiribin yan jî Dara sozên danî nanîn cîh ji bo wê hatibe kuştin. Ew yeka di filmé "İskender" de jî tê dîtin, lê sedem nayê dest nîşan kirin.

Edet û sîstema rêvebiriya Saka bi ya Kurdên li dervayé vvelat ve gelek dişibîne hev. Wextê kralêkî Sakan dimir, ji wî re goreke kûr dikolan, paşâ ew krem dikirin û di nava hemû élan re derbas dikirin. Xelkê rûyên xwe duriçikandin, pore xwe dişâqandin/ pî, enî, pozê xwe dibirîn û hesinek di destî xwe yî çêpe re derbas dikirin.(h>3'16) Her çiqas ew tevgerana di nava hemû civakên élan de heye jî, Kurdên Anadolê heta salên dawî ew hereketana dikirin.

Navê kralên Saka jî balkeş in û bi kurdî ne. Hinek kralên wan navê xwe wiha ne: Arîantas, Arîapeîthes, Madyas, Opoîa, Taxahîs e. Ar-îantas û Ar-îa-peîtethes bi agir ve giredayî ne û yê dawî jî hem agir e û hem jî pêtî ye. Wekheviya wan navana bi forma navê Erîvan û Azerbeycanê yê kevn ve jî dişibine hev.

Wekî me berê jî gote, ci vaka Sakan ji élan pêk dihat, vana bi rêya serokêlan bi hev re yekîtî û rêvebirî avakiribûn.(153'17) Ew sîstem heta derengî li cem Kurdên Anadolê jî hê zindî bû, ku sîstemeka demokratîk e

jî. Her êl nûneriya xwe dibîne û dibe xwedî gotin. El yan jî berên Sakan jî mirov dikare wiha rêz bike, lê ew ne ji sedî sed in. Yekê jî, Heredot vana wek berên cîranê Sakan dinivîse; lê di dizîna dawiya pirtûkê de wek berên Iskîtan tê nîşan dayîn: Agathyrs-Iskîtên Ewrûpa (li cem wan, jin malê herkesî ye), Amyrgîa, Getaî, Halîzon (başûre Rûsya), Hyperbore, Iyrkaî, Kallîpîdaî, Katîarî, Massaget- Aral, Melankhlen (vana reş lixwe dikin), Naûrî, Oneat, Paralataî, Saûramat û Thyssaget in.,84‘220) Budîn-Gelon jî miletekî por sor in û eslê wan Yewnan e. Paşê Budînî tevlî wan dibin û zimanekî tevlîhevbi kar tînin.(84 221)

Li dinê xaliça herî kevn jî ji alî Saka ve hatiye çêkirin. Ew jî, bi jiyana wan ê bi pez re têkildar e. Ew gela hemû deman xwedî pez bûye û di nava wan de çanda pez pir kur û fireh e. Dîsa ji Kurdan bêtir ti netewên din hêst û evîne xwe li ser xaliyan neqiş nekirine. Yek ji wan xalîça li Pazirik-Rûsya derket, mînakeka baş a ji kêla Arranî ye, ku di cîhanê de ya herî kevn e. Meyîtû/Laşû mirovayê ji Pazirikê derketî piranî wek Ewrûpî ne, lê mirovên Indo-Ewrûpayî û Mongolî jî peyda dibin.

Nivîskarên Swêd balê dikşînin ser niqteka din ê girîng û dibêjin: Sakan, diyalektên Irani yen cûda diaxivîn. Tekiliya wan bi çanda Derya Spî re jî hebû.(153‘21) Diyalektên cûda jî îdea me ya ku Saka ji Zaza, Kurmanc, Lor û Belûcan pêk dihatin bi hêztir dike. Seferoglû dibêje, zimanê Saka yen ku 700 sal BI hatine Rojhilata Navîn bi yen Kurdên li Yenîsey ve dişibiya hevûdû.(91~ 9)Tekiliya wan bi çanda Derya Spî jî dide xuyakirin ku ew xelka bi eslê xwe ji vê herêmê ye. Bi taybetî jî Xorrî li vir nişteçîh bûn û piştre ji ber ûrîşan ber bi rojhilat û rojhilatê bakûr ve çûbûn.

TÛR-TÛRAN Û SEDE-SÎNSÎNKO

Di beşa Kurd û Macaran de jî min qala idea yen dîroknivîsê Tirk kiribû. Gor wan: Saka yên Qefqas derbaskirine û heta Filîstîn çûne rêberê xwe Alp Er Tunga ye. Tekoşîna wî serokî bi kralê Fars Kûroş ê II an ve bûbû

babeta destanan. Fîrdewsî vê wek tekoşîna Iran-Tûran dineqişîne.(148'74) Gelo ew idea raste? Emê vê yekê ji nêzik ve bikolin û bingeha lêkolîna min jî bê guman Fîrdewsî ye.

Ewên Tirkan baş tahlil dikin û nasdikin mentalîta wanê dîrokî jî dizanin. Ew dibêjin; em netewekî Tûranî ne; yanê eslê xwe bi Tûran ve girêdidin. Nijatperestên wan jî heta demên dawî, digotin emê îdeolojiya Tûranî pêk bînin. Armanca wê jî ewe: sînorê dewletê heta Tirkek li ku dijiye fireh kirin bû. Tûran welatê wan e û sînorên wî jî, ji Iranê destpêdike heta Derya Adriyatik... Gelo rastiya Tûran çi ye? Wekî dîroknivîsê Tirk Kara dibêje, tekoşîna di navbera Alp Er Tûnga yê Tirk bi kralê Iran Kûroşâ II an de ye?

Fîrdewsî, pirtûka xwe bi navê Şahname di salên 1010 an de (80 salî bû) teva kir. Ihtîmaleka pir mezine ku ew li dora bajarê Tûs hatiye dinê. Tûs bajarêkî Kurdan yê kevn e. Gor ew dibêje, ji mezinan, serpêhatî û çirokên wê demê sûd wergirtiye ew pirtûka dîrokî nivîsiye. Şahname li Xorasan û îraqê gelek nêzîkayî dît û hê jî ji gelek lêkolîneran re dibe kaniyeka dîrokî. Fîrdewsî wiha dinivîsîne: Kralê yekemin ê Ecem Kiyûmersê ku gor rîwayetê tê qal kirin wiha ye. Ew, li destpêke di nava çiyayan de rûdinişt... Wî şaristanî anî nav însanan.(8624) Diyare ku miletê Arran ji ber dijminan xwe avêtiye nava çiyan û demeke dirêj li cîhê asê jiyaye. Lê pişti hesin bi kar anîn edî ew dadikevine qada şer û dewletê fireh dikin. Li ser vê Fîrdewsî wiha dibêje: Di serdema to- rinê wî Flûşeng de, ji nava keviran hesin hat derxistin, ji wî kêr, tevşo û bivir hatin çêkirin. Hesin li kevir xist û agir derket û cejna SEDE ji vê demê tê û agir bû qîble.(88'32> Cejna Sede ji bo me di du xalan de girîng e. Yek: Ji bo ku ew bûye qîbla miletê Arran, divê dîroka vê gelek kevn be. Ya duyemîn jî, giredana vê bi cejna di nav Kurdên dervayê Welat de ye. Kurdên îro li Anadolê dijîn berê Newroz nedizanîn! Li cîhê vê qala "Sîn-Sînko" dikin. Mezinan berê digot em Sîn-sînko dilîstîn. Lîstik jî wek Newrozê ye. Yanê agirekî mezin dadidan

û di dora agir re govendê digirtine; xwe di ser de hil kirine û raseiê hevdû dikirine. Gelo ew cejna Hûşeng Sede bi Sin-sînko ve ne yek in? Wek nav gelek nêzîkî hevdû ye. Coğrafya ku texmînî lê pêk hatî jî coğrafya ew Kurdên Anadolê jê hatine û ji bo ku Kurdên li derva dijîn tekiliva xwe zêde bi yên li Kurdistanê nişteciîh re jî tunebû ew Sede bû cejna wan ê netewî. Yekê jî, ew di demeka pir kevn de pêk hatiye, îhtîmaleka mezine ku formata vê ye kevn ew be. Cûdahiya zimanê Farisî jî faktoreka ku mirov li ber çav bigre. Gor ditina min ew cejna Sede bi Sîn-Sînko ve yek in û yekê jî kî dizane ku forma yekemîn a Newrozê ne Sed e? Yane, li destpêka dîroka Arran Sede hebû, pişt re ji zilim rizgarbûna miletê Arran de Newroz derket holê. Ji bo ku Kurd beşek li derva bû, Newroz

di nava wan de wek Newroza rizgarbûne cîh negirt...

Kurê Hûşeng, Tahmûrs nivîs fêr bû: ew fêrî rûmî, erebî û farisî kirin.. .(86‘ 32) Fêrkirina rûmî û erebî mirov fêhm dike, lê çima farisî? Gelo ew ne Faris bû? Ji vê tespîtê te fêhm kirin ku ew koka ne ji nijada Farisan e.

Fîrdewsî babeteka din a balkeş jî dini vise û dibêje: Arteşa Tahmûrs hemû bi cilên reş bû.(K6 32) Wekî me di beşa Xorriyan û Medan de jî qal kire; ji Xorriyên dora Helebê re Çûxreşî digotin û gelé bi navê Reşan ji navenda Xorasanê alîkarî dabûn Medan. Çûxreşî tê wata ewên ku cilên xwe reş in! Arteşa Tahmûrs jî bi cilên reş bû ye, gelo ew temamî teseduf e? Eger em bînin bîra xwe, dema Heredot berên yan jî cîranê Sakan dinivîsand qala Melankhlen reş lix wed ikin kiribû.(84"220) Ji ber wan îşaretana dîtina min ewe, ku pêwîste tekiliyeka Çûxreşî, Reşan, Saka û artâşa Tahmûrs hebe...

Kurê Tahmûrs, Cemşîd jîzirxçêkirinû xelk wek çîna rûhban (Katûziyan), arteş (Nisarêyan) û gundî (Nesûdî) kire beş. Bûyera Kawa, Dehaq û Newrozê di dema wî de ye. Xelk ji Cemşîd nerazî bû, esker yek û yek ji Iranê derketin. Siwariyên Arranî yen ku ji xwe re li padîşahekî digeriyan,

çûn ba Dehaq û ew wek kral anîn ser texte Iran. Kesên ji ber marên di mile wî de derketine, reviyan çiya û Kurd ji wan peyda bûn.(8M0/54) Ev babet gelek girîng e û di hûndiiê xwe de gelek tiştan vedişere. Yekemin derdikeve hole ku Sedê berî Newrozê ye; lewra bûyera Kawa piştî Sedê pêk hatiye. Ya din jî xelk ji Cemşîd nerazî bûye û ew ji welatê xwe derketine û piştre jî serhildanê pêk anînê..

Ji sûlala Tahmûrs yekî bi navê Abtîn anîn ser text. Ji wî jî Ferîdûn ket. Ferîdûn, berê çû dora Dicle, paşe çû ser Beytûlmukaddes (Kudüs). Ji Ferîdûn re sê lawik bûn: navê wan Selm, Tûr û Ireç bûn. Paşe Ferîdûn dewleta xwe di nav hersé lawên xwe de wiha parve kir: welatê Rûm û rojava da Selm; welatê Tûran da Tûr û ew kire padîsahê Çîn û Tirkan; welatê Iran û Erebîstan jî da lawê xwe yî biçûk îreç.(86"12n) Gor vê jêdere aşkereye ku kralê Arran sê kurên xwe hebûne û yek ji wan jî Tûr ê ku beşa welatê rojhilatê daye wî. Navê welatê rojhilatê ji navê kralê wir Tûr tê û ji bo vê gotine Tûran. Ku ew di nava Kurdan de gelek normale. Yan jî, ewên girêdayî w'î û ew xelkên ku ew jê berpirsiyar re gotinê Tûranî. Di vir de navê miletekî yan jî nijadekî qetî derbas nabe. Di cîlde duyemîn de jî wiha tê gotin: Gor vê biryarê, ji Ceyhûn heta sînorên Tûr û ji wir jî heta Çîn û TToten ê dan miletê Tûran. Lê di Şehnama li Afganîstanê hatî çapkirin (1361 Delwa) de dibêje dan Tûraniyan û ti qala miletê Tûran nake.(187‘ l4> Wextê tê tercüme kirin bi zanistî yan jî bi nezanî ew şaş tê tercûmekirin. Bi kurtî: Tûranî ne miletê Tirk e. Ew miletê di bin desthiladariya Tûr de ji gîştikan re Tûranî hatiye gotin ku din nava wan de Çînî, Kurd, Tirk, Tacik, Belûc û miletên din jî hene. Vê demê îdeaya nivîskarên Tirk şaşe.

Piştre, kralê Tûraniyan Efrasiyab ji kralê Iraniyan Keykûbad re namekê dinivîsîne û wiha dibêje: "Ew Yezdan bila rehmetê bideFerîdûnê ku nijada me jê hatî.087'645 Eger ew kralê Tûraniyan wekîdea dibe Tirk bûya, çawa

dikaribû ji kiralê Arran re binivîse û bibêje Xwedê rehmetê bide kralê nijada me Ferîdûn?

Di rûpelê 278 an de jî wiha dibêje: " Şahe Tûran zemîn" (çapa li Afganistan rûpeî 102) lê di wergera Tirkî de tê gotin ku Padîşahe Welatê Tirk.{187'278) Li vir jî vekirî hatiye nivîsîn ku kralê erd-zemînê Tûran, nabêje miletê Turan. Di rupela 309 an de jî: "Ji wî welatî bi vir ve pir ferq nîne, yanê Semengan, Tûran û Iran hemû yek tên hesibandin.1187'309*

Paşe di navbera her sê birayan de şer dest pêdike û Tûr serê Ireç jêdike. Ew şeıû nav xweyî gelek salan dom dike û di dawî de torinê Ireç Minûçîhr xeber werdigire ku artâşa Selm û Tûr ji çemê Ceyhûn derbasbûne û tene şer. Mînûçîhr herdû apê xwe dikuje. Di esas de ew şere Kurd û Kurd-Persan e. Gor dîtina m in ew qewma ya j i Tûr mane, Kurdên îro li dervayê welat dijîn in. Ew bi idea Kara yê ku dibêje Saka ji ber Iraniyan revîn û beta Filîstînê belav bûn ve jî hevûdû digire. Heta pey va Tûr-k-men jî ji wir derdikeve... Di navenda van (Tûranî) de jî konfederasyona Reşan, Cilreşan û Reşiyan hene. Li jor ine got ku Saka kalê Kürden li dervayê welat in, bi xelkê Tûr ve heman xelk in. Li vê demê Kurdên girêdayî Tûr ji bira û pismamên xwe yen din vediqetin û ber bi bakûr û bakûrê rojava hildikişin. Hinek nivîskarên rojava jî li ser Tûraniyan dîtinên balkeş tînin ziman ku yek ji wana Nybergê dibêje: Navên koma ku Tûran (Tirk) têyî hesibandin hemû Iranî ne, bi vî awayî dema Avesta dihate nivîsîn, Tûra (mebesta nivîskar Tûranî ne) kalen Aryan i yen derbasî Îrane bûne. Chrîstensen dibêje: Gotina "Tûra" Iranî bibe jî nebe jî, ji sedî sed êlên koçber tarîf dike û Aryanî ye.(71'l88) Aryanan xaka Turkmenîstana îro bi carekê re terk nekirin. Ewên hatine îranê û bi cîh bûne, ji yen ku nehatine re gotin "Tûr" û va ya bi Mit e kê (efsaneyekê) xemilandin. Digotİn Kawa mîrnîşîna xwe di nav sê kuren xwe de parve kiriye: Li gor vê Sarîma da rojava, Türya da rojhilat û Arya jî da navendê. Dema tu li vê dinêrî Tûra bi Mazanan

(Mazenderan) ve dû êlên Aryayî bûn û nêzîkî hev rûdinişti n. Beşekji wan di dema Zerdeşt de li Asya Navîn hîna jî aktîv bûn.!71190) Bele ewên nehatine re piştre gotin Turkmen. Yanê wek Türkan man.

Wek tê zanîn nivtskarê cara yekemîn îdea kiribû ku: nijada Kurd ji qewmê Iranî ye, ji kesên ji ber Dehaq reviyabûn çiyan peyda bûne, Fîrdewsî ye. Gelek nivîskar û lêkolîneran jî ew dîtin ji wî wergirtine û bê şik bikar anîne. Bê guman, eğer Fîrdewsî zil ma li ser Kurdan qest kiriye û zilimkar di şexsê Dehaq de sembolize kiriye xerê raste. Eger dîroka Kurdan digihîjîne vê demê tene xerê ewî ji zanistiya dîrokî mahrum bu yê, Yêk jî nivîskarê ku ew îdea Fîrdewsî wergirtî jî Şeref xanê Kurd, wiha din i vise:

Kurd, ji nesla wan însanan in ku ji bo çareserkirina birîna ser herdu milên Dehhaq (Biwrasp) serên wan dihatin jêkirin û mêjiyên wan dihatin derxistin û li wan birînan dihatin pêçan, vêcajiber rizgarbûna ji serbirîn, kuştin û qirkirinê yên derkehne serê çiyayên bilind û asê ne. Dehhaqê (Zehaq) Maran ku pêncemîn padî§ahê FÛşdadiyan (Bişdadî) bûye, li ciyê Cemşîd li ser textê Iran û Tûranê rûniştiye û dest daniyê ser piraniya cîhanê, kesekî bê merhemet bûye... Zana şairekî zîrek wiha dibêje:

"Ku Cemşîd rewan bû berew goreşar

bi zor hate cixß wî ejderhayekîgemar

Qederê, xivest ji axa he ft îklîman

Serî bitewînin li ber Dehhaqê wekî Şeddad..." <1S7'61>

Di wir de niqta herî girîng ew e, ku Cemşîd li ser textê Iran û Tûranê rûniştiye û qederê, xwest ji axa heft îklîman... e. Di vê helbestê de jî xuyaye ku wê çaxê sînorê dewleta Arranê li coxrafyeka heft îklîman belav dibû ye. Sînor û kewşene welatê Kurdan ji Derya Hurmuzê destpêdike heta Meletî û Mereşe, Welatê Faris, Iraq, Ezerbeycan, Ermenîstana Biçûk û ya Mezin, Iraqa Ereb, Mûsil û Amed dibin başûre vî sinorê han.(157"63)

Hinek êlên Kurdan ketin aliyê Mûsil û Şame, ên wekî Dasnê, Xaldî, Besnayî, birek ji Mehmûdî û Dun- buliyan Ezdî ne. Kürden din bi piranî sunnî û li ser şopa îmamê Şafiî ne.1157'64'

Ji pirtûka ku Fîrdewsî nivîsî em li ser Rûstemê Zal jî agahdar dibin. Li ser jiyana wî gelek niqteyên balkeş derdikeve peş ku ew lehengê bi nav û deng bi giştî di nav miletê Arran, bi taybetî jî di nav Kurdên li derva de pir bi nav û denge. Gelek taybetmendiya çiroka wî di nava çîrokan de heta roja îro di nava Kurdên Anadolê de zindî ne. Fîrdewsî wiha dinivîse: Sam lawekî xwe yê mîna zarokên şeytan tê dine, pirça canê wî hemû spî bû, çavên wî reş bûn. Xwestin wî lawikî ji holê rakin û birin ser çiyayên Elbruz (gor Fîrdewsî ew çiya di navbera Hîndîstan û Iranê de ye. Lê di esas de ew ne çiyakî bi tene ye: Ji başûri? Derya Xezer destpêdike heta bakûrê Iranê direj dibe). Li wir çûka bi navê Sîmûrg hebû. Tê nivîsîn ku deng hate guhê Sîmûrg ku digot: "Çûka pakij a pîroz ". Paşe Zal dibêje min wek Xwedê bawerî pê anî.(S6'2lB) Lêkolînêr Andrew Collîns(159)di vê baweriye de ye, ku berê çûk di nava Kurdan de pîroz hafiye ditin. Fîrdewsî: Sîmûrg ziman bi wî fêr kirin da, paşû wexta ewê here mal ji nav baskên xwe du perik danê û go: "eger tu ketî tengasiyê ji wan hebekê bavé nav agir.(86~21ü)

Li ser wê babetê û nêzîkî vê bi dehan çirok di nava Kurdên li dervayê welat de tên gotin. Yek ji vana jî çiroka "Keça Axî Periyan"e.

Serefxan jî dibêje: Pehlewanê mêrxas û bihêz Rustem kurê Zal, ku di dema Keykûbad Şah de jiyaye, lavvekî Kurd bûye, li Sîstan (Sicîstan)hatiye dinê û bi navê Rustemê Zabi? navdar bûve. Fîrdewsî, wî bi navê Rustemê Kurd dide

J 1

nasîn. Her wiha di dema desthilata Hurmizê kurê Newşîrewane Fermanrewyê Ecemîstanê de Deryayêmê Çûpîn fermandarê artöşa Kurd bûye, li Türkistan û Xoresanê hatiye perwerdekirin û di şeren li van deran de nav û dengê wî belav bûye. Kurtî (Kurt) û sultaneyên Gûrî yen dema Islamiyetê ji koka wî ne. Vana pişti dewleta Ilxanî bi fermana Mengû Qaan bûn fermanrewayên Gûr, Hîrat, Sîstan û Belûcîstanê. Yekemînê wan Melîk Şemse dîn Mihemmed bûve û di

A _

sala 643 an BT de fermanrewatiya Xûrîstanê ketiye destê wî.(lj7‘65)

Di şere Arraniyan ya navxwe (Iran û Tûran) de Rustem her daîm rizgarkarê alî Iran e. Di esas de wekî bere jî min göte evv şere nav birayên bi navê Ireç, Selm û Tür e. Di şere dawiyê yê navbera hêzan de Fîrdewsî îşaret bi niqteyeka balkeş dike: Tûran û kralê Tûran Efrasiyab li hember Rustem têk çû û revî. Bi xwe li peş, eskerên Gûr/Gor jî li paş reviyan, feydê hêvî dikirin le zirar kirin û çûn. Felekê bi ya wî nekir û Gor reviya û rêya Tûran girt.(187‘240) Di vê niqtê de gelek pirs derdikevin holê. Wekî em dizanin Gor, Goranî-Zaza yen îro yî ne. Gelo şer di navbera zarava axêfan de bû? Yan jî Goran bi Turkman bi gotinêka din bi Kurmanc, Lerên îro li dervayê Welat ve di nava heman rêxistinê de bûn? Niqta din ê girîng jî navê lehengê Tûranî ye. Navê wana bi piranî Arranî ne, wek mînak: Kerûhan, Seksar, Barman, Hazervan, Şemasas, Kerkûy e, ew belge û îşareten derdikevin holê ne tesadufî ne û îspata vê ne ku Tûran ne Tirk in û piraniya wan Kurd û miletê Arran in.

ZELANÎ

Dîrokzanê Kurd Izady coğrafya Zelanî-Zilan wiha tarif dike: Ji kaniya Dicle re, Zelê û bajarê mîna Yozgat, yanı heta Kapadokya Pontûsa antik re Zelanî dihate gotin. Zelanî di nava sê kraltiyan de hatibûn dabeş kirin;

cara yekemin dema bi Medan re alîkarî kirin batin rojava. Beri Medan jî hebûn, pişti Med û di dema Axamenîşan jî ji sedî sed hebûn, Zelaniyan, bi îttîfaqa Medan ve axa xwe heta Konya û Enqere fireh kiribûn. Zelaniyan di dagirkirina keviyên lyonya û rojhilatê başûre Ewrûpa de rölen taybet listin. Paytexta zenda Zelaniya yê bingehîn, yanê yê Kapadokya berê Meletî bû, piştre bû Mazaca/ Qeyserî. Di vê deme de, zenda Pontûs ku paytexta wan Zela/Amasya paşe jî bû Amîsus/Samsun derbasî peş bûn. Zenda Kommagene ye biçûk bû. Vana bi mîmariya xwe Nemrûd tên nasîn. Ji Kommagene heta roja îro navê êla Kurd a Kowa/Koma ye ji wir tê. Ew Kürdana 3000 sal in xwediyê axa xwe ne. Navê wek "Zilan û Milan" hate tiû beşkirin, bingeha hebûna Kurdên rojava ye, ku heta îro parastine.(154'85) Tespîtên birêz izady balkeş in. Balkeşiya yekemin, tespîta ku beri Medan jî hebûna Kurdan ya li vê herêmê ye. Ya din; navê êla bi Kowa/Koma ye ku îro jî li herêmê Kawî ye hene. Ya sêyemîn, beşbûna Kurdên

rojava wek Mil û Zil e. Bave min digot; em bûne du şax: Zil û Mil. Em (Reşî) ji Zilan in. Ew kîngê pêk hatiye? Li ser vê ti agahiyên saxlem nîn in.

Li ser vê dabeşkirine Avyarof dibêje: Kurdên ku zivistana diçûne Direzor, Haleb, Riha, Mêrdîn û çiyayên Sincarê re digotin "Kurdên Mil." Evên li Amedê re digotin "Silivî" û evên ku li Aranê (Di navbera Ararat, Xezer û çemê Kur de) dijîn re digotin "Zil".(28) Mumkune ew rast be, lewra konfederasyona Milan divê navê xwe ji wir girtibe û wekî tê zanîn cîhê wan jî coğrafya Avyarof tarif dike ye. Şaxê Zilan jî yên li bakûrê wan dijîne.

Mîthridates ê ji Medya, ji bo ku birayên xwe Pontûs li hember genaralê Roma Locûllûs bipaiêze şer kir û jiyana xwe ji dest da. Şûna kurê xwe

Mede Dara derbas bû lê di encamê de Roma li ser axa Zelaniyan wejî/bilind bû (154-88) Medan alîkarî bi birayên xwe yên rojava re kirine, nizanim ew ji ber welatparêziya wan e yan jî hevkariya wan e. Wekî me göte Saka jî ji Medan re komek/alîkarî kiribûn ku Nînova hil weşandibûn. Dîsa me li jor jî işaret kiribû, ku Zelanî beşekî Saka ne. Ihtîmaleke ku ew dubendiya Mil û Zil jî, wê demê jî pêk hatibe. Bi taybetî jî dema ji navenda Xorasanê û bakûrê Derya Reş hatin, li bakûrê Kurdistanê ew bûn du şax û mumkune navê xwe ji wir girtibin. Lê, li ser axa Kurdistanê hêzên mezin riheti nedidan xelkê, ji bo vê jî her demê çûyîn û hatina navenda Xorasanê û bakûrê Kurdistanê pêk hatiye. Yek ji wan bûyerena jî di dema Jûlîûs Sezar de pêk hatiye.

Di sala 47 an BI de, Jûlîûs Sezar artûşa Zelanî têk bir. Bi ser vê de jî Zelaniyên Pontûs 100 salên din li başûre Ukranya-Qirim û Bosporos ê yanê li diyaspora jiyana xwe berdewam kirin.(154 89) Vegerîna Zelaniyan a başûıe Rûsya jî balkûşe, lewra me gotibû ku ji vê herêmê hatibûn. Ew dîsa vedigerin herêma ku ew nasdikin. Cama jî Roma, ew wek kraltiyên girêdayî xwe dan jiyandan. Strabon, ew kombûna li Pontûs bi koça ji Kapadokya ve girêdide û vana wek "Soranên Spî-Leukosurioi" bi nav dike. Ew hatina Soranên Spî wek BI 1000 an sal tê hesibandin. Jêderên antîk Roma û Yûnan wana wek Faris binav dikin.(I8J'89) Dîsa pir balkâşe ku ew dibêje Soranên Spî, wê demê mirov dixwaze bipirse ku gelo ew Lek bûn?

Birêz Izady dîsa bi niqteyeka balkâş îşaret dike, ku Kurd di dema antîq de jî li dora Derya Spî hebûne. Ew tespîta di jêderên Roma de jî heye. Tê fêhm kirin ku ji dema antîk ve Antakya û keviyên Derya Spî û Amanos welatê Kurdan ê dayik e. Bl di 300 an de Antîockhûs Kurd li bajarê Antakya nû hatî avakirin û li dora Iskenderûnê bi cîh kirin. Gelek malbatên pêşe mîna: Veras (Baraz) û Belcanae (konfederasyona Belikan) li wir bicîh kirin û tekiliyên wan bi Roman re baş bûn.(154 91) Berazî hê jî li Riha û

Sûrî dijîn ku pismamên Reşiyan in. Belikan jî îhtîmaleka mezine, ku bavé Bilikî yê îro li Anadola Navîn dijî ne. Di jiyana Kurdên li Anadoliya Navîn de mirov şopa Roma (dibe ya Ermenan be jî) hê jî dibîne. Wek mînak: dema zarok nexweş dikevin eniya wan bi riciyê, hêkên bin mîrişkan bi rengên cüda, yarên penêr bi riciyê û kevirên koşû xaniyan wek îşareta xaç ê lê dikolin û îşaretan lêdexin...

ÇEND BÛVER JI DÎROKA KURDAN VÊN PIŞTÎ MÎLADÊ

Dîroka Kürden dervayî welat ê Piştî Mîladê teyî zanîn pir qeis e; bê guman ew bi kêm bûna dîrokzanên Kurdan ve û bi navên Kurdan yen cüda cüda derbasî dîrokê bûyinê ve girêdayî ye. Dîrokzanekî Kurdan ya dîrok bi kûrî tahlil kiri mixabin tine, lê ew bi şerten dîroknivîsên Kurd tê de dijî ve girêdayî ye. Bê guman gelek dîrokzanên hêja hene, lê ji bo ku ew neçar in nîv profesyoneli binivîsînin jî nikarin ji bin wî barê giran derkevin. Mirov dikare bibêje ku beta destpêka Isla me li ser Kurdan jêderên dagirtî gelek kêm in. Eger Kurd bi navên mîna Saka-Iskît, Zelanî û hwd di dîrokê de cîh bigirin zahmete ku mirov şopa Kurdan bibine. Lê, barê giran li ser lêkolîner û mejûnûsên me ye ku bi kurahî dîrokê bikolin û ew kêmasiya agahiyên Pişti Mîladê ji holê rakin.

Di sala 36 an BI de, Kurdistan ket bin destê fermandarê Roma Marc Antonyûs. Wî kralî bi Açxaniyan ve şer dikir. Medên li Ezerbeycanê xwedî dewletekabiçûkbûn jîji Aşxaniyan re alîkarî dikirin.(I9) Di vê demê dejîhebûna Kurdan ya li Ezerbeycanê girînge. Ew yeka ji xerîte û belgeyên wê demê manî de jî tê pêjirandin. Di hebûna Kurdan ya li wir guman tinin, lê kîjan Kurd li wir bûn ew girîng e. Hêvîdarim dîrokzanên Kurd van yekan rojekê tam zelal bikin. Di wî şerî de jî alîkariya wan ê ji Aşxaniyan re jî diyar dike ku hê hest û ruhê Arranî di nava wan de bi hêz e. Lê, Rom têk çû bi şûn de bûyerên pêk hatine jî îşareta gelek rojên reş didin. Kurd û Partan li ser xenîmeta li hev nekirin û Medan bangî Roma kir ku bila êrî§

bikin ser Partan.(19) Bi dîtina min di vir de Kurdên navê xwe derbas dibin Soran, Hew rem an in yan jî dehndikê Medan in; Part jî kalên Kurdên li dervayî welat in. Bi ser vê bangê de Roma, Ermenistana di destê Medan de, kralê part Fraat IV an jî dewleta Med dagir kir û ji holê rakir.(19) Her çiqas tê gotin Med ji holê rakirin jî ew yeka bi hêsanî nebûye û di firehbûna Roma yê ber bi rojhilat ku bi 100 salan ajotî de jî ew xuyaye. Kevnên me digotin: "Ji Sêwasêber bi rojava Roma Reş e!" li wir Sêwas wek sînor ketiye mejiyê kalên me. Ku mirov dikare bibêje çemê Fi rat sînorên Rom û Kurdan yen xwezayî bûn. Kurdên li rojava jî girêdayî Rom man, yan jî piraniya wan ber bi bakûr û rojhilat belav bûn. Bi tavbetî ji herêma Dêrsîm, Ezerbeycan û başûre Rûsya. Li ser vê Izady dibêje: Li rojava yê Firat, roj bi roj Roma ber bi mîrîtiyên Kurd fireh dibû û ew jî dibû sedema şeran. Di sala 72 an PT de kraltiyên Kurdan bi zorê ketibûn bindestên Roma. Tenê li Qirim kraltiyek Kurd 200 salî din di bin siya Roma de jiya.(l54'83) Ewên li Qirim kîjan Kurd bûne nabêje, lê xuyaye ku ew nîvserbixwe bûne.

Salé 106 an BI herêma Sêwasê kete bin destê Roma û navê Sebaste lê kirin; di dura Mereş (Germanisia) wek sînor kirin bin kontrola xwe. Sala 36 an BI kral Lukullusbajarê Samsat, Kolik û heta başûre Firat bi piranî kire bindestê Roma. Di heman salé de serleşkere Roma Mark Antonyûs Kurdistan kir bin kontrola xwe. Di wê demê de tişte balkeş, Kurd li dijî Asûriyan bi Roma ve

ketibûn îttîfaqê û bihev re hevkarî dikirin. Néron, Kurdistan û Ermenîstan dagir kir.

Şere di navbera Irana Sasanî û Imparatoriya Bizans de gelek zirar da Kurdistan û Kurdan. Di şere pir dijvvar ê di navbera hêzên Rom û Iraniyan de, navenda Kurdistan kete bin destên Iraniyan. Şere di navbera salên 502-505 an PT de Riha hat şewitandin û xera kirin. Di dure herêma

bakûrê-rojavayê Kurdistanê kete bin desthilatdariya Sasaniyan. U gelé li Farqînê bi zorê ajotin Xûzistanê. Di vî şerî de Amed sê mehan di bin dorgirtinê de bû û paşe Irani bi fêlbazî ketin hundur û ji xelkê 80 hezar kes kuştin. Paşâ bi piştgiriya élan Roma dîsa Amed wergirt.(19) Sasaniyan di destpêka sedsala VI an de, ji bo Hûn ê ku ji bakûr de ketine welatê wan rawestîne, êla Gor ê Kurd ku li çiyayên Elbrûzê li başûre Xezer dijiya bi piranî bir li Xorasan û bakûrê Xorasan bi cîh kir.(4 l99) Ji wan herdû koçên bi zorê jî zêde agahiya me nine. Ihtîmaleke ku ew li dora Xorasanê gîhiştibin hev. Li ser vê Xemgîn dibêje: Di sedsala VI an de, Deryam V an yê Sasanî, ji Farqîn û ji başûre Derya Kesk êla Gor birê Xorasan. Li wir ji sala 1148-1215 an de dewleta Gor avakirin. Ew pesna xwe bi hilweşandina saltanata Dehaq didin. Dewleta Gor di sala 1107 an de bi Selçûqiyan re hate girêdan.*10153) Li ser axa Kurdistanê herdû dewletên bi hêz; bi taybetî li Mezopotamya, Şehrîzor û bakûrê rojhilatê çemê Dicle daim şere hev dikirin. Sasaniyan di navbera salên 602-628 an de gelek cîhên mina; Mezopotamya, Misir, Sûrî û Ermenistanê yên di bin destên Bîzansan de kirin bin kontrola xwe. Şere herdû dewletan heta êrî§ên Erebê misilman dom kir, kingê Ereban erişi Kurdistan û Iran kirin û ew têk birin; herêma Kurd lê dijîn kirin bin desthilatdariya xwe.

Ji bo me û dîroka Kurdên dervayê welat gelek xelek hene ku girîng in, lê di şe^n îro de mixabin em li ser wan zêde tiştan nizanin. Yek ji wana di sala 130 an PI de pêk hatiye. Atlasa mirovatiyê dinivîse ku: Saka bi Yûezhî yan (divê ew Ezdi bin-Ş) ve çûn herêma Hindistan û Bextiyariyan. Herêm vê demê ji ali Helenan (Makedonan) ve hatîbû dagirkirin. Ew li wir man û bi cîh bûn.(66‘70) Çûyîna wan, îhtîmaleka pir mezine ku bi ew'lekariya dewleta Sasanî ve girêdayî ye. Lewra wê demê ji Sasaniyan re tehlûkê ji rojhilat de ji ali Hûnê Spî ve dihate kirin. Doré salên 400 PI jî êdî dewleta Sasanî lawaz bû û Hûnan dest bi erîşan kirin. Di wê demê de, xelkekî bi

navê Sogdina jî derbas dibe, her çiqas agahiyê min li ser kêmbe jî di wê baweriyê de me ku ew jî xelkekî bi Kurdên li dervayê welat re giredana xwe heye. Dibe ku Ler bin. Ew Sogdina di sala 565 an de bi Oxûzan ve dewletekê ava dikin. Oxûz, li rojhilatê Gola Aral ber bi navenda Asya belav dibûn. Emê li ser Oxûzan jî bi firehî di rûpelên peş de rawestin. Berê jî me got ku, Hûn heta Derya Spî çûbûn û hema vegereyan jî; îhtîmaleke ku ew ketibin dû Kurdan. Di jêderên vê demê delê gotin ku: Di sala 445 an PI de Hûn hatin Muxana-Ezerbeycan, dema ew hatin navê Kurdan jî li herêmê derbas dibû û ji bo wan: kesên xwedî pez û koçber dijîn digotin. Dema Ereb hatin Kurdistanê jî navê Kurdan derbas dibû. Nasir Xusrev di Zafername

Birêz Varli jî wê demê qala Hukumeta Daboweyh-Dabowehiyan (525¬775) dike. Gor wî: Êla Kurdên bi navê Dabûyanê ji Kurdên Gîlan-Cîlan- Ceylanê ne.(32) Di dîrokê de ew herêma demeka dirêj di bin destê Kurdan de, bi taybet jî di bin destên Kurmanckî axifan de ma ye. Dabûyanê ji 85 heran pêk dihatine. Di sala 622 an de hemû Medistana kevin digrin bin destê xwe û di sala 640 an de jî misilman hêdî hêdî kontrole dikin destên xwe. Di sala 752 an de Şerwî miriye û kurê wî yê bi navê Espêhîd Xurşid bûye serok. Di dema wî de Ebbasiyan ji wî alikariyê xwestine. Paşe jî ji alî Ebbasivan ve welatê wî hatiye xirab kirin û bixwe jî ji ber wan reviyaye. Gorî hinek dîrokzanan ew qet nebûne misilman.(32> Hîna jî li vê herêmê Kurdên Kurmanc, Ler û Gor hene.

Ji kuştina Eba Muslim şûnde Kurdan dest bi serhildanan kirin. Elên Kurdên ku li başûr û başûre rojavayê Derya Kesk dijîn di dema Sasaniyan de jî serbixwebûn. Di sedsala V û VI an de rewşa xwe hîn xurt kirin û li hember Bîzansan, alîkarî didan Nestorî û Cûhiyan.<10133)

Jêderê Çerkezan jî bûyerên sala 550 an ji devê Prokapi Kerasyatî wiha

radigihînin: Li wî welatî keleheka pir saxlam ya bi navê Tsibila heye. Di navbera hukumdarê Laz û Tardet ê ji maleke mezin dihatî de nakokî derket. Bi ser vê de Tardet bi Medyan (Kurd) ve lihev kir û keleh teslim girt. Paşû jî Apsilya bi giştî kete deste Medan. Di sala 551 an de, artâşa ji Ecem û Alanan (di vvata Kurdan de bi kar tine) pêk dihatî di serdariya Khoryan de erişi Egrisiyê (cîhe birêvebirina kraliyete) kir. Le li hember arteşa ji Rum û Lazan pêk dihate de têk çûn û Khoryan hat kuştin. Di gelek şeran de em dibinin, ku Bizans, Hûn, Abaza û Lazan li dijî Kurd û Farisan hevkariyê kirine. Lê di sala 572 an de jî, artâşa ji Ermeniyan, Kolkhidan; Abaza û Alanên di bin serokatiya Sarok ê Alan de, li dijî fermandarê Irani Miryan de digihîjin hevûdû.<62)

Şeren bi dehan salan di navbera Rom-Sasanî û Bîzans-Sasaniyan de heta salên 639 an de berdevvam kir û herdû alî jî ji wan şeran lawaz ketin. Ji vê yekê heri baş Ereban istifade kir û bi taybetî jî bakûrê Kurdistan ji ber vê sedemê bi hêsanî kirin bin destên xwe.,61) Wekî tê zanîn Ereban di sala 751 an de êrî§î herêma gola Aral kirin, Çini têk birin û dewleta Sodîana kirin bin destên xwe. Bi vê yekê re girêdayî pêwîste bê zanîn ku heta wê çaxê li herêmê: yanê bi te- mamî li Kurdistan, Iran, Derya Kesk, gola Aral û heta Çin bandora Zerdeştî pir bi hêz bû.

Kurdên ku di sala 1000 an de li Elbîstanê dijiyane di wan salan da Sêwas heynan destê xwe û xwe avêtin hundirê Anadolê. Pa§ê ji bo parastinê hatin şandinî Qarya (?) û dora 20 hezaran bûn. Di sala 1050 an de êdî bi cîh bûn. Di gava êrîijên misilmanan de vana di navbera misilman û xirîstiyanan de bûne. Eger biçûyana kîjan ali ew alî di şer de bi serdiket. Edi misilman bi riya van Kürdana di sala 1081 an de li Konya û Qeyserî yê bi cîh bûn. Di pirtûka "Dîroka Qereman" de gotina "Kurê Bahaddîn Menteşe bi 8000 Kurd beşdarî şer bû" ye derbas dibe. Di sala 1150 an de Tokat, Sêwas, Engorî/Enqere hemû kirin bin destê xwe. Ji bo ku li

Stenbolê Latînî bûn desthilatdar, Kurd bi hêsanî di Anadolê de dibûn desthilatdar. Bi Selçûkiyên Qonyayê ve jî şer kirin. Ew xelek ji bo dîroka me girîng e, lê em niha derbasî ola wan ê kevn bibin. Li pöş emê dîsa li ser vê babetê rawestin.

MAZDA-ZERDEŞTÎ, ÊZDATÎ Û ELEWÎTÎ

Hîna ku em derbasî beşa serdema Ereban û belavbûna Islamê nebûne, pêwîste li ser ola Kurd û Arraniyên kevn çend gotinan ragihînin. Herçiqas di şeren berê de rola netewan hebe jî, bi piranî şer li ser ol û belavbûna ol bû. Ji bo ku dîroka miletan û bi taybetî jî ya Kurdên îro li dervayê welat baş bê fêhm kirin, pêwîste di alî olî de baş bê analîz kirin. Xwezî kesekî jêhatî tenê li ser ola Kurdên îro li dervayê welat lêkolîneka kûr û berfireh bikirana! Ew kesê ku wî karî bike bila bizane ku valahiyeka mezin ê tije bike. Ji jêderên heta îro hatine nivîsîn, emê hewl bidin ku li ser ola Kurdan yê kevn çend xalan ronî bikin.

Hema hema hemî lêkolîner û nûser yekdeng in ku olên dinyayê herî

kevn Mazda (Hurmuz) ye û kitêba herî kevn a pîroz jî Avesta ye. Lê tnixabin ew yeka navê dîtin û Cihûtî, Xiristiyanî û Misilmanî bi zanistî derdikeve peş. Lewra îro jî, ol bûne alava siyasî û aborî. Ji ber vê, herkes tê de ye ku erdnîgariya ola wan bi bandor fireh bibe. Ola Mazda û fikrên Zerdeşt ji hemû olên ji vê şunda hatî re bûye kaniya raman, civakî û ruhî. Hemî olan jê kopye girtine, lê gotine ew fikrê ol û pêxemberê me ne... Felsefa Elewîti ya olî û nêzikbûna xwe ya mirovan jî ji Zerdeştî tê. Wata Mazda di zaravê kurdî kirdkî de: 'Maz'=Em û 'da' jî tê wata dayîn ê. Yanê em dan, em xulk kirin hwd. Di kurmancî de jî Xada-Xwedê-Xudê: Xa-xwe-Xû: Bixwe, da jî dayîn e. Yanê bixwe xwe da. Yezdan jî tê mana Yê-ez-dam û Ezda; Ez-da ye.

r vX K-TVi \TKu £ M«rr'îü dîT tî 1--

Nivîsa Avesta

Mamostê birêz, lêkolînerê kurd hêja Dr. C. Bender dibêje: Gelé Kurd, di alî raman û olî de ji xelkê cîhanê re rêbertî kir. Dîsa di dema xwe de gelé Kurd dît, ku baweriyên berê bersiv nadine û derî ji olên semawî re vekir, ji olên kevn jî îstîfade kir û bingeha ola Zerdeştî danî. Zerdeştî di navbera olên pirxwedêyî û yekxwedêyî de pireyek e. Zerdeşt pêxember alimekî ku zagona olên din ên piştre derketî re bingebî kir; kitêba wî ya bi navê "Zend Avesta" bi xwêdana eniya wî derket holê. Zerdeşt, gelek Xweda daxistin Xwedeya qenciyê Hûrmûz û ya xirabûye Ahriman. Cara yekemîn Zerdeşt qedexe kir ku xelk bawerî bi keviran (pûtan) bîn e.(123-971 Xweda yê ola Mazda, Ahûra Mazda ye; Pêxemberê xwe jî Zerdeşt e. Wata wî navî, stêrka zêrînî ye; tê gotin ku li eniya Zerdeşt hestirka zêrînî hebûye. Li eniyên zarokan zêr giredana Kurdan ya ku heta roja îro berdewam dike, tê texmîn kirin ku ji vê kevneşopi\û tê.. Li ser vê babetê Prof. Hermann Beach dibêje: Navê xwe Zoraaster e; -aster: stêrk e û zora jî tê wata zer. Eflatûn jî Zerdeşt, wek dameziranê ola Mazda dide xuyakirin.(53) Gelek baş tê bîra min: ku pirka min, zêrekî nîvî bi benîşt bi perçêma birayê min ê biçûk ve zeliqand û ji me re jî digot: "Miqate bin bila kes jê neke." Yanê, ew kevneşopiya heta çil salî berê jî di nava Kurdên Anatoliya Navîn de hebû ku koka vê digihêje pêxember Zerdeşt. Olperestên Zerdeştî dibêjin; pêxember li bajarê Rê (Tehran); Faris jî dibêjin ew li bajarê Belxê hatiye dinyayê; lê tê zanîn ku Ew li çiyayê Elbrûzan derbasî tenebûnê (înzivayê) bûye. Xwedayê vî olî yî demê Zervan û yê dipî yê jî Vayu ye.(53)

Nivîskarê misilman Kazwînî, ji Hz. Muhammed vê gotinê ji me re radigihîne: "Di navbera Ezerbeycan û Ermenîstanê de çiyayê Sabalan heye. Di wê çiyayê de pêxemberekî raketiye. Vê herêmê havînên xwe dirêj in; avê xwe sar in û ewna jî xelkê dikşînin wir. Li wir dareka bilind

heye û li dor vê giyayek dirûze/şîn dibe ku ti ajal naxwazin di wê mintiqê re herin; ewên ku jê

xwarine jî pê hema dimirin."(7l‘h4) Zerdeşt ji 23 saliya xwe ve, ji bo ku bi xwe re têkeve muhasebe çû çiyayê Sabaları derbasî jiyana înzîva bû.(71146) Ew cîhê ku Hz. Muhammed gotiye min li Xorasanê peyda kir! Li bakûrê Xorasanê, di navbera Turkmenistan, Afganistan û Iranê de rêzeçiyayên Hezarmecîtê hene. Li qotê herî bilind, tê gotin ku berê şikeftekö hebûye û kesekî di wir de jiyaye. Iro ew tune; lê li ser qot du çavî xanî çêkirine û tê gotin ku dema Imam Elî li hember Rûsan li wir şer dikiriye êvaran dihatiye vir û bêhna xwe vedaye... Ew xeyal e, lewra dîrok vê dîtinê napejirîne û Elî jî ti caran nehatiye vir. Lê cîh pîroz tê dîtin û xelk qurbanan tîne lê serjêdike û hêviyan dike. Pîrozbûna vî çiyayî ji Zerdeşt Eêxember tê. Lê dewleta Iranê ew zivirandiye ser Imam Elî, ji bo ku Şîîtiye hîn xurtir bike û xelkê hîn zêde bi xwe re girêbide; di vê yekê de jî bi serketiye. Li pişta wan çiyana, bi taybetî jî pişta wî qotî bi qasî hezar metre dirêj û weqas jî pan cîhekî heye ku ew giyayê ku Kazwînî dinivîsînî lê dirûzê. Kurmancên wir navê "Axû" li giya danîne.

Axû

A

Iro jî di zimanê me de ji jehr re dibêjin axû. Wextê nifira dikin dibêjin: "Mêro, tu axûya marî kor bixwî! " ew giyakê ku mirov destên xwe pê bike û paşê jî bibe lêwen xwe hema di cîh de dimire. Çi ajal bixwe dimire. Xelkê herêmê vvî tevlî hevîr dike û davêje nava çeman, dema masî dixwin dimirin û xelk hundirê wan pakij dike û dixwe. Dema hişk dibe ti zirara wî tune, lê dema ter bû hemî tişt pê dimirin. Li nava meydana va giya dirûzê darek jî heye. Yanê, ji sedî sed tarifa Kazwînî digre û heman cîh e.

Îhtîmaleka pir mezine ku Zerdeşt Pêxember li wê herêmê maye van jî jiyaye. Li jêra wî çiyayî kaniyek heye ku ava vê ji heman çiyayî tê û dora wê jî gelek xweşike. Hewa zozanan dide mirov lê îro av kêm bûye û navê kaniye jî kirine "Kaniya Miradan". Ku kê çi miradê (mirazê) xwe heye, tiştekî davêje kaniyê û ew mirazê w7î tê cîh... Min jî pere avêtê û Kurdistaneka azad xwestibû... Gor gotinê mezinen wir: Berê li wir hersai cejn pêk dihatine û ji Hîndîstan, Afganistan, Kurdistan û Iranê gelek mirov dihatine û cejnê pîroz dikirine. Ew jî îspateke ku Zerdeştî li wir jiyaye û ew cîha bûye tewafgeh ji oldarên Zerdeştî re.

Kaniya Miradan

Beri her tiştî pêwîste mirov li ser kesê ew ola afirandî raweste; li ser wî gelek lêkolîn hatine kirin û gelek dîtinên cûda hene. Lê emê dîtinên S. Bîlgîn bingeh bigrin: Zerdeşt ji ku bû? Nivîskarên Greka Klasîk (Ctesîas) dibêjin: Ew kralê Bakterîa yê li rojhilatê Iranê bû. Grek îddîa dikin Zerdeşt 6000 BI jiyaye.(71' 129) Lacantîus (300 PI) dibêje ew kralê Medya bû. Yên misilman jî dibêjin ew ji Ezerbeycanê (Şîz-Ûrmiye) bû. Gnolî yê Ttalî jî (1980), Gola Hamûnê di navbera Iran û Afganistan cîhe Zarathûştra ola xwe belav kiriye. Ew cîhê teye qebûl kirin Sîstane ku ola Ahûra Mazda lê "hatiye dinê".(71'94) Hemî ew mintiqên ku tên heldan di dirêjiya dîrokê de cîhên ku Kurdên koçber lê jiyane. Bi dîtina min jî rojhilatê Iranê raste; ew cîha dikare bibe mintiqa Gola Hamûn / Sîstan yan jî Xorasan; heta dikare herdû jî bin. Li jor min qala Xorasanê kir ku gelek îspatên bi bingeh û hêz hene. Lê hinek lêkolîner û pirtûkên pîroz jî dibêjin dora Gola Hamûnê ye. Kolanên li vê herême tê kirin gelek cîhên kevn derxistin holê û eger mirov çand, ziman û olên xelkên vêdere jî bide ber çavan îhtîmaleka ne dûre, ku li wir jî jiyaye. Ji bo wê dîtinê mînaka heri baş Xwedayê Hîndûyan e.

Di dawiyê şeren di navbera Hatî û Mîtaniyan de peymanek hate morkirin. Di peymanedeşahîd, "Axê Agir" yanjî "Xwedayê herî mezin ku agir afirandî-xulk kiri " yanı, "Mîthra" ye. Xwedayê herî kevn ku li ser keviran hatî nivîsandin ev e; teqriben çar hezar sal in. Hîna jî ev yek ji Xwedayê Hîndûyan e.(7134) Xantosê ji Lîdya (BÎ 470) îddîa dike ku Zerdeşt 600 sal beri şere Troya yanê BÎ 1800 jiyaye.(7l‘13,)

Baweriya Zerdüştî 3000 sal BI derket; Rêxemberê xwe yê yekemîn Mahabad e; yê duyemîn Huşeng (tê îddîakirin ku ew Hz. İbrahim e) 2040 sal BÏ jiya û yê dawî jî Zerdeşt e ku sala 600 BÎ jiya ye. Di dema Zerdeşt de bawerî wek sîstemekê bi rêxistin bû û ji alî Med û Akamenîdan ve qebûl bû.<125 22) Zerdeşt ola Mazda reforme kir û evên van yekan qebûl nekirin re "Mazdak" gotin. Mazdakî herî pir li dora bajarê Heratê hebûn û di dema kralê Sasanî Kawa (488-531) de rabûn ser lingan û yekî ji kesên isyankar ji kral re got: "Fêwiste reformên civakî pêk bînî, divê jin û mal ji alî civakê ve tevhev bên bikar anîn..."(52> Di Zerdeştî de heyî(hilberîn) pîroze û ji bo wê elementên ku dinya pêk tînin mîna: av, ax, hewa, metal û nebat pîroz in.(125‘24) Ji ber ku di Zerdeştî de bînfirehî û xweşbînî heye û Elewîtî jî berdewamiya wê olê ve, ji ber wê humanîzmê nebû desthilatdar.(125'28)

Dîtina din ê dijber ku dibêje Zerdeştî ji rojhilatê îranê ye, ji alî Bilgîn ve bi vî rengî ye: Zarathûştra li Atûrpatakan (Ezerbeycan) hat dinê (BÎ 637-560), xwest ku mala bavé wî û axayên herêmê reforma erdê bikin; erd li karkeran belav bikin.(71 259) Bi ser vê daxwazê de, bi biryara malbatê ji mal hate avêtin û çû ba pismamê xwe malbata Notarya. Gatha (ayet) bi zimanê Aryanî nivîsîn. Ji bo ola xwe belav bike, li rojhilatê îranê fersend dît û bi qebûl kirina Magûyan re ola xwe zû belav bû.(71118) Di her pêvajoya dîrokê de di navbera Ezerbey¬can û Xorasan û der dorên wir de ev tekilî hebûne û gelek êlên Kurd li herdû herêman jî jiyane. Yekê jî dora

Xorasan her wext bûye keleha oldarên ji miletê Arran. Dîtineka ne şaş e, berovajî raste, lê di alî demê de gumanên min hene.

Di ola Mazda-Zerdeştî de agir û cîhê ku agir lê vêdikive (Ocax-tifik- kuçik) pîroz e; ji ber vê gelên cîran bi wata 'Xelkê bawerî bi agir tîne' re "Mecusî" gotine. Ji ber vê jî, Alawî/Elewî û Kurdên Anatoliyê û yên- rojavayê Kurdistanê dibêjin: "Ocax KurbiyoL" û agirê di ocêx de jî pîroz tê dîtin. Heta roja îro, li Anatoliyê mirov nikarin di ser kuligê re herin û dibêjin guneh e. Di nava hemî Kurdên Anatoliya Navîn de berê, wexta mirov nexweş diketin di bine kuligê de qulek vedikirin û nexweş di bin wê re derbas dikirin. Baweriya wan ew bû ku bi vê yekê nexweş sax dibin ku nîşana pîrozbahiya agir e... Dîsa mînakeka balkeşe, li Qonya Gundê Bûldix qewimiye; jinikek dema bûye bûk agir vêxistiye û ev ara heta mirinê qêt venemirandiye. Tê gotin ku wextê ew koçber bûne jî agir dikiriye pişte hê§tirê û digerandiye. Dîsa li alî Sarizê û li gundên Cihanbeyli li ser xaniyan resmê rojê çêdikirin. Li Sarizê, ji derdê li ser penceren xaniyan û li ser rojing-pacê agir wênê rojê dihate çêkirin. Li gundê Sêvika-Bûldûx jî heta dema dereng li ser hinek

xaniyan sêniyên mîna rojê ji derve dikirin peşiya xaniyan. Di Zerdeştî de agir wek kurê Ahûra Mazda tê dîtin û kesên bawermend nedikarîn pişta xwe bidin agir. Li aliyê Qonya dema tu li tuwaletê rûnî gereg tu berê xwe bidî rojê, eğer tu pişta xwe (bidî rojê) di rojê alkî guneh e. Di ayînên Elewiyan de jî her tim agir wek sembol tê dîtin. Di Zerdeştî û Elewîtiyê de roj (-agir), hevva, av û xwelî-ax pîroz e. Di Mazdaîzm-Zerdeçtiyê de, meleyen ku perwerde dibûn hildikiştin heft qatan. Ji vana ya duyemîn "Sir girtine" û di Elewîtiyê de jî ev wek "Siri Hakikat" heye.(53) Di Kurdên Anatoliyê de jî girêdana soz û sirrê gelek girînge, eğer kesek vê yekê neke qîmeta wê/wî dadikeve pêne peran.

Di ola Zerdeştî de agir, parçekî ji rojê ye û ji bo wê jî pîroze. Wek ruhê Ahûra Mazda tê pejirandin. Ew pîrozbûna ji alî civakê ve jî tê parastin û em herroj dibînin: ku ji bo ku agir qirêj nebe oldar dema nêzîkî agir dibin, ji bo ku nefesa wan û tûka wan agir aciz neke devê xwe dİgirin; av li agir nabe; vemirandina agir guneh tê zanîn.(125'31) Zerdeşt di dema xwe de sê agirgeh çêkirin. Yek ji vana li Xorasan-Belx e, ya din dîsa li Xorasanê û ya sêyemîn jî li dora Urmiye bû.(125~33) Xemgîn jî dibêje: Zerdeşt, agirgeha xwe yekemin li Belx a Xorasanê, ya duyemîn li nêzîkî Urmiyê li bajarê Şiza li Textî Suleyman û yeka din jî li Xorasan tê texmîn kirin. Zerdeşt şaîr bûye û nivîsên xwe yên din wek beyta ne. Wekî tê zanîn di nava Kurdan de bi tavbetî jî di nav yên li Anatoliya Navîn de jî beyt gelek dihatin gotin. Di belav kirina ol de mele di nav xelkê de digerîn û tembûr lêdexistin û beyt dixwendin.(52)

Frédéric Spîegel dibêje: Ola Buda jî di bandora Zerdeştî de ma û ewên ku ji ber misilmanan reviyane li Bombay a Hindistan bi cîh bûn. Wekî tê zanîn li dijî misilmantiyê li navenda Kurdistan, çiyayên Elbrûzê-li Başûne Dery^a Kesk (Dîlam, Gûrgan, Mazenderan), Ezerbeycan û Xorasanê raperînên mezin pêk hatin.(52) Ola Mazda heta dema Xelîfe Ma'mun (813-833) jiyana xwe berdewam kir. Xelkê Kurd li cîhên çiyayî yen Elbrûz, li Dîlam, Curgan, Mazenderan û Gibal di bin serokatiya Mardawîç de di sala 928 an de serî hilda. Di sala 930 an de, li herêmê Dewleta Kurdên Dailam saz kir. Dîsa li herêmê di navbera salen 1077-1256 an de dewleta girêdayî ola Mazdaîzmê ya bi navê Alamût jî jiya. Samaniyên li Xorasan jî girêdayî Mazda bûn.

Wek tê zanîn berê zarok wek qurban dihatin serjêkirin, paşê bawermendên Zerdeştî ew bi ajalan guhartin û paşe jî ew têne bi beşekî ji ajalan sinûr kirin. Li her cîhê Kurdistanê, berî qurban serjê bibin agir dihatiye vêxistin û ew pîroz dibûye. Di perestgehan de agir hertim vêdiket

û pîroz bû.(i°i-f>4) gj piraraî Perestgeh çargoşe bûn û di nava wan de jî agir vêdiket.1101"651

Sembola Xwedê yê Zerdeştiyan wekî Hurmuza Persan perik û boça çûçikê kirine hundirê xelekekê. Li ser kolanên Asûr jî ev wêne heye. Dîsa ew navekî Baalî (roj) hatiye guhartin jî mirov dikare bêje.{68)

Pirtûka "Kizilbaşligin Esaslari-Bingehên Qizilbaşiyê" çîna oldarên Zerdeştî wiha beş dike ku bo me pir baBdi-ş e: Çîna li jor "Megûşa-Rabba" in; yên li navê "Reşa Damgûşe" û yên dawî jî "Rab Mohpate" ne.(125'35> Navê Reşa

di dema Med û Saka de jî gelek caran derbas dibû, ku me got kalê Kürden îro li dervayê welat in. Bi heman navî jî wek çına Zerdeştiya navîn, idea min xurtir dikin ku ew jî îspateka din e, ku Kurdên koçber baweriyê bi Zerdeştî anîne. Derba davvî erişen Ereban li ola Arranan xist ku carake din nikarî pişta xwe rast bike. Wekî heman pirtûk jî destnîşan dike: Piştî erişen Ereban û berfireh buna Islamê ola Zerdeştî di sê beşan de rola xwe berdewam kir: Yek, komên ku ji Zerdeştî tawîz nedan û ti caran bi misilmanan ve lihevnekirine ku em ji vê re Ezdî dibêjin. Ya duyemîn, Sersorîtî-Elewîtî ye ku ji ber erîşan ketiye rengê misilmantiyê. Ya dawî jî Sunnîtî ye, ku hê jî şopen Zerdeştî di navê de hene.<125'9,) Bi rastî dema mirov kûr analîz dike şopa Zerdeştî aşkere ye. Hinek beş dikarin dijîtiya vê bikin, lê ev rastiyek e. Di nava Ezdatî û Sersorîtiyê de ew şopa berbi çav e û kesek nikare vê nebîne. Lê di nav sunnîtiya Kurdên li Anadolê de misilmantî ne ji dil e; ji derdê ye û mîna pîne ye. Di roja îro de peji-randineka ji dil heye. Beri deh-bîst salan ew tunebû. Heta mirov rastî tevgerên gelek radikal dihat û ji misilmantiya wan mirov dikete gumanan.

ÊZDATÎ

Çîn yan jî koma ku ji ola xwe yê kevn qet tawîz nedaye û gelek caran li hember Ereban, Kurdên misilman û mîletên din bi komkûjiyan re rû bi rû mane Ezdî ne. Pir caran xwe di nava çiyan de veşartine, di komkûjiyan re derbas bûne, koçber bûne lê kêm ji wan misilmantî qebûl kirine. Hinek lêkolîner dibêjin Ezdî yê ji çîna Medan olperestên bi navê Magî ne. Wek tê zanîn Herodot ew wek êleka Medan nîşan da bû. Di nav Kurdên îro li dervayê welat de jî, vekirî xuyaye ku ew bere Zerdeştî, paşê Ezdî, paşâ jî bi dor Xuremîtî- Sersorî-Qizilbaş, Elewî û Sünnî bûne. Di nav kesên îro Sünnî de jî îşaretân Zerdeştî û Ezdatî pir balkêş in, lê dîsa jî ew babeta li benda lêkolînerên jîr e.

Mîna Zerdeştî oleka dûalîste, Ezdî di vê baweriyê de ne, ku rind û xirabî hertim bihev re di nava tûkoşînekû de ne û rengê herdûyan ji Mazdeîzm tê. Di Ezîdiyatî de cîhê Ahûra Mazda de Melekê Tawis heye. Wekî Sorhalaman (Xuremît) di vê baweriye de ne ku roja mehşere nîne û ruhê mirovan dema dimirin dikevin laşû mirovekî din. Di nava civaka Ezîdiyan de heft çîn hene, ewna: Mîr (meqamê dinyeyî heri mezin), Extiyarê Mergê (fetwa dide), Şex (nivîskar in), Feqîr (digéré û waaz dide), Pîr (rê nîşan dide), Beşîman (lêkolîner), Kawal (sewa hecê Sembola Tawis û çira di nava xelkê de diğerinin), Köçek (ermîş in), Murid in. Wekî tê zanîn li ser Ezîdiyan 72 ferman û komkujî pêk hatine.

Dameziran û pêxemberê ola Ezdî wek tê zanîn Adî bin Misafir e. Di sala 1075 an de li Beeka yê li gundê Beytfar/Kirbet Kanefar hatiye dinyayê. Koka bavé wî Ismaîl digihîşt Merwan el-Hakim ê Xelîfe Emewî yan. Diya xwe jî Yezda bû. Misafir, li Bexda ders girtin û paşû çû Laleşû; paşâ bi hevalê xwe Abdûlqadîr el-Cilanî ve çû Mekkê û bû hecî. Cilanî paşâ terîqeta Qadirî damezirand.(33) Bi

dîtina min, ne mümküne ku mirovekî wek Adî biçe Mekkê û bibe heciyekî misilman. Mi rovê ku here wir, bi ola Ezdî ve dikeve nav nakokiyeka

mezin. Divê ew dîtin yan jî agahı şaş hatibe fêhm kirin yan jî bi zanistî dixwazin vê ola hanê bi Islamê ve girêdayî nişan bidin, Dîtina dijberê vê jî ev e: Şex Abdilqadir Gîlanî (hicri: 470-528) yê ku ji xelkê Gîlanê bû (nêzîkî Qezvînê) û dû şexen sofi yen Kurd jî sagirtên wî bûn: Şex Mosayê Zolî ji Mêrdînê û Şûx Hadî (Adî) yê Hekkarî yê ku li ba Kurdên Êzdî roleka xwe bingehîn heye.<77'13) Ew dîtineka rasttir e lewra: Gîlan û Xorasan ji bo ola Zerdeştî û olên li dijî Islamê bûbûn navenda perwerde û di gelek aliyên din ên civakî de ew herêm li pûş bûn.

Bîlgîn dibêje: Ola Kurdên Ezdî; Zerdeştîzm a milekî Mîthraîzm (efendiye agir) ve tevlî hev bûye. Qizilbaşen li bakûr û Ehlî Haq ên li rojhilat û başûre Kurdistanê; Mîthraîzm-Zerdeştîzm û Islamê tevlîhev kirine, rêyeke din peyda kirine. Bi taybetî Kurdên Qizilbaş berê, bi derketin û çûyîna avaye rojê re ayîn dikirin, cem dikirin û li wir şarap vedixwarin û "ji bilî gepa yarê hertiştek parve dikirin" şopa ola yekemin bi xurtî nîşan dide. Baweriya li hêviya Mêhdî û têgîna Xizir Aleyhîselam direkt ji ola Zarathûştra girtine. Di ola Kurdan yê kevn de rojiyê pir kin dajot, li cem Qizilbasan jî ew dilsariya olî heye.. Ocax di Elewîtî de pîroz e; di ola Mîthra de jî ocax pîroz bû. Agir hêza herî mezin a îlahî bû, sembola vê jî roj bû. Qewl dayîn di Elewîtiyê de pîroz e; di Zerdeştîzm û Mîthraîzm de jî ew esasî ye. Xulasa Elewî, Ezdî û Ehlî Haq bawerî û çanda Kurdan ya kevne herî baş parastine.(7153) Di nava Kurdên li Anatoliyê û Xorasanê de jî giranî û hêviya Mêhdî hê jî heye.

Di kovara Laleş-II an de, birêz Selîm Biçûk li ser pirtûka pîroz ya Ezdiyan wiha dinivîse: Tevî ku piraniya bîr û baweriyên Ezdiyan bi Zerdeştiyâ re dibin yek lê dîsa pirtûka Avesta mîna pirtûkeke xwe ya pîroz napejirînin. Bi tenê navên du pirtûkan finin ziman: Mishefa Reş û Celwa. Herdû pirtûk jî piştî mirina Şûx Adî hafine nivîsandin. Lê hinek çavkanî dibêjin ku ya yekemin Şêxadî bi xwe nivîsandiye. Piştî lêkolînan digihîjin vê baweriyê:

Guherîna (reform) ku Zerdeşt di Ezdayiya kevn de çêkirî bû ji hêla hin Ezdiyan ve nehatibû pejirandin. Lê piştî êriijên Islamê, pêwîstiya hîn guhartinan tê dîtin. Qehremanê vê guherînê jî dibe Şêx Adiyê kurê Mûsafirê Hekarî yê ku bi xwe ji bav û kalê xwe ve Zerdeştî bû. Ew guhartinên şeklî bûn ku bikaribe bi rastiya Islamê re bimeşe. Hinek jî li hember wê derdiketin. Şene di navbera dr^opên Şêşims û Şâxsin heta roja îro jî hin şopa xwe heye. Rûspiyên Ezîdiyan dibêjin ku Şêxsin dixwest hîn guherînên din bike lê aliyê din ew nepejirand. Ji ber vê Ezîdiyan baweriya xwe avêtin hundirê xwe û bi vî awayî Avesta ji mêjiyê Ezdiyan hat hilanîn.

Ezdî, him di nava misilmanan de him jî di nava xaçperestan de wek "agirperest", "Bêbawerî" û "Mûm vêdimirandî" dihatin sûcdarkirin. Sykes dibêje: Li eskeriyê, Zazayên ku bûbûn misilman ji rabûrdiyê xwe bi şerm bahs dikirin, lewra wana bawerî bi agir tanîn.<60) Mezinen me qet nedixwestin ser vê defterê vekin, dema me pirs dikir digotin: "Ser van perdana venekin!" ew niqte

buhuşte derxistin. 2. Dema keştiya Nûh Bêxember qui dibe û av dikeve nave, surra Tawisî-Melek digîje mare reş û ew dice xwe li ser vê qulê dipêçe. 3. Mare Reş ziyaret e, ew bi kesî venade û divê tu jî wî nekujî..." Vî mari, bi çîroka mar-jina Sakan re têkîliya xwe heye an na, nayê zanîn, lê gereg hebe, h inek jî dibêjin di tofana Nûh de mar ketiye quia keştiye û mirovatiyê xelas kiriye û ji bo vê pîroz tê dîtin. Di nava Kurdên dervayê welat de jî girîngiya mar hebû.

Li ser serpehatiy'a pîrika min jî eğer mirov hesap bike hîna jî watedar dibe: Rojêke min li ser kaniya me çermekî maran dîtibû. Ez şaş mabûm ku mar post davêje. Min anîbû mal. Pîrika min dît, ji destê min girt û da bin beroşa tiji şîr ku ya bûbûya mast. Min got d aye tu çima didî bin beroşe?

Got: Lawkê min bereketa şîr pir bibe! Wekî tê zanîn gor zanyariya wan însanan, bereket tenê Xwedê yan jî meleken pîroz tînin. Ji wê jî mirov vê encame bi rihetî dikare derxe: pîrika m in, x wendin û nivîsandina xwe tunebû, nûçe gûhdarkirin tunebû, ji ji bilî Kurmancî jî tu zirnan nedizanîn û tevgera wê ji ceribandinên ji hezaran salan dihat. Yanê wê jî ji de û bavên xwe fêr bûbû. Bi Şahmaran rı serpêhatiya Saka ve bi vî awayî digihîje hev... Mînorsky jî dibêje: Mar di nav ola Ezdî de semboleka rola xwe dilîze ye; mümküne ku koka vê pir di kevn de be û sinûrên olekî derdixe holê. Herodot dibêje: Saka (Alan) koka xwe digîhînin Xweda marakê nîv jin.(12-424) Xwedaya Babîliyan jin Tîamat û yan Saka ya jin mar bûn. Keçên me demên berê cihêzên xwe de weneyên Şahmaran çêdikirinû ew li oda xwe ya raketinê dadixistin û bawer dikirin ku ew berekete, heyî ye û zayînê pir dike.(194) Dîsa di kurdî de ji bo zevacê tê gotin ku; "Lê mar kirin!" ew jî vekirî dide diyarkirin, ku di civata Kurdan de mar xwedî cîhekî girînge.. .Eger lêkolînek bibe ew dikare bi Xwedêyê Sumeriyan Dumîzî (Xwedayê zayînê Zawzê) ve jî bigihîje hevûdû. Spîegel jî têkiliya vê yekê û Ermeniyan çêdike: Elên Ermeniyên esilzade dibêjin em ji koka kralê maran yê Med tên. A. Collîn dibêje: Kralên Medan ji alî cîranê wan Persan ve bi şana Mar dihatin nasîn.(159 234) Di nava Rûs, Ermenî, Îskît, Med û Kurdan de efsaneyeka bi vî rengî heye. Ji bo wê gereg mirov li ser efsana marên di milên Dehak de bi hêsanî derbas nebe. Di vê efsanê de, sê kesên ku xortan rizgar dikin navên xwe Armaîl, Kurmaîl û Durmaîl in. Li Kurdistanê herêrna Oramar gor kevneşopiye parezgeha maran e. Xiristiyanekî ewliya yê bi navê Mari Mummu, maran hîpnotîze dike û dike kîlera dêrê. Ew dêra hê jî heye. Bekçî-notirvan hersai bave maran dibîne. Gor baweriyê eger xiristiyan ji rê derkevin mar ê derkevin û li dinyayê belav bibin. Cuhiyên Qefqasya jî efsanake xwe heye ku dibêjin marekî heft serî di bin derê malê de ye û ew ji hizûra malbatê berpirsiyar

e.(l2" J24) Di nava Kurdên li Qoçgirî û Dêrsîmê de jî mar xwedî girîngiyê ye û gelek bûyerên bi van re girêdayî hene. Henry Layard jî dibêje: Mar, di ala Êzdatî de xwediyê cîhekî taybet e. Tenê di dema rojiyê de ji wî re hürmet nedigirtin.{159'21B) Gor Êzdiyan tufana Nûh ê duyemîn 7000 sal berê pêk hatibû; keştî hîn li çiyayê Sincar sekinî bû kul bû û ew kula ji alî marekî ve hate girtin û ji ber wê hemû însan û heywan ji mirinê rizgar bûn.(159'226) Gor efsaneya avabûna di Yaresan

de, Azazel, hîna neçûbû buhuşte di xizmeta mar û Tawis de kar kiribû. Di nav bexçekî li dinyayê veguherî melekekî xweşik û Adem û Hevva teşvvîk kirin ku sembola bereketê genim bixwin, ne meywe! Ji ber wê, Azazel, Mar û Tawis ji buhuşte hatin avêtin.(,59'24,,

Me gotibû ku Sembola Zerdeştiyan perikên çûkan yen di nava xelekêke de bûn. Ew yêka di kolanan de jî derdikeve hole. Li ser vê yekê birêz Collîn wiha dibêje: Kolanên li Kurdistanê û Anadolê hatî kirin de, derket hole ku 8870 (+/- 300) sal BI nişteclhân vê coxrafyayê serên sîsolekê ji xwe re dikirine şaman. Yani di kolanên li Çatalhoyuk û li rojhilatê Kurdistanê di şikefta Şanîdar (Zêyê Mezin de ye û hat îspatkirin ku êlên koçber herî kêm 100 hezar sal zivistanan ew dera bi kar anîne) de jî ser û perikên bazan derketin. Li Çatalhoyukê mirovekî perikên çûkan (teyr û toy jî hatin ditin) li xwe kirî û di depokî de serê 15 bazan û seriyên 15 bizinan derketin. Li wir derdikeve holê ku tiştâ herî pîroz ji çûkên bi perik hatiye sembolîze kirin. Iro jî ew di Baweriya Ezdayetî de xwe nîşan dide. Çûka Toyê ji vê şikeftö derketî jî ji alî Ezîdiyan ve pê bawerî tê kirin û ew li Kurdistanê jî dijî. Tê vê watê ku dê û bavên Kurdan baweriya xwe bi wan çûkana anînê.(159*313)

Di Ezdayetî de roj pîroz e. Di nava Kurdên li Anatoliyê jî pîroze û hîna jî êlên li Qoçgiriyê li hember rojê dûa dikin ku bi êlên li Anadolê û Xorasanê ve parçên hev in. Mixabin em nizanin ku dema dûa dikin çi dibêjin? Lê

Ezdî wiha dikin: piştî dest çav şûştinû, pişta xwe girêdidin û bi evîneke mezin berê xwe didin rojê; destên xwe dide ser milên xwe û pişta xwe xûz dike:

Dûaya êvarê:

Tebarek eldîn

Ya siwarê roj hilatê, roj avayê

Ella ehsenil xaliqîn

Hûn bidine xatirê doté û dayê

Bi hîmeta Şemsedîn

Hûn me xilaskin ji qedayê ji belayê...

Faxiredîn, Sicadîn, Nasirdîn, Babadîn

Şeş imsê qeweta dîn

Siltan Şex Adî tacil ewel in heta axir in

Heq hemdila ya rebil alemîn

Xêra bide şera wergerîn

Mehderekê dixwazim

Bi rehma Şex Adî rezay melîk Şûx Sin

Kerema şeş ims

Amîn Amîn

- •AA*! ! AAAA! A !A

Bi roje u agir bawer kirin ne mexsusi Ezîdiyan yan jî Kurdên li dervayî welat in; hemî Kurd û Arraniyan de ew yeka heye. Heta dema dawî ew berdewam bû le niha kêm bûye. Dema serbazê Îngîlîz F. Bûrnaby di sala 1876 an de ji Wane tere Hoyê li ser giran xelkên ku li roja diçe ava temaşe

dike dibine. Bersiva ku ji rehberê xwe yê Tirk girtî "Ew ji rojê re baweriyê tinine!" bûbû.. Serbaz û rehberê wî yê Tirk li kêleka wî jî dibêje:"Çend caran ji bo wê min ew hişyar kirine û zor daye wan. Le Bersiva wan tim ev e ku ew baweriyê bi rojê naynin, tenê dema ro diçe ava ew diçin ser girekî û ev fêrbûna ku ji bapîran ve mayi ew berdewam dikin. .."(56) Bi vî awayî çewsandina Osmaniy^an û misilmanan ya li ser Arraniyan derdikeve holê ku ew neçar d iminin ku ayîna ola xwe İnkar bikin.

SERDEMA EREBAN

Dîrokzanê Kurd Tori dibêje di salên 2600 an BÎ de, Sami li bakûrê Sumeriyan bi cîh dibin û ji vê pêvajoyê şunda Sumeriyan mina xwe dikin.{9) Ewê ku mina xwe kirine îro kî ne? Tam nayê zanîn, lê binek ditin hene ku dibêjin Asûrî ne... Hinek çavkanî jî dibêjin ku Ereb di salên 3000 an BÎ de, ji Afrika, di bakûrê Sûriyê re hatina heiêma Sumeriyan. Lê ew ji bo me zêde ne giringe û ew karêkî dîrokzanan e. Ji bo me niqta girîng ewe, ku di beri hatina Ereban de jî xelk li vê mintiqê hebûne. Her çiqas zêde zelalî li ser dîroka kevn tunebin jî, gor dîtina min hatina Ereban gelek zirar da xelkê kevne, mina Sumerî û Kurdan. Di serî de ji şaristaniya pro-Kurdan û miletên din ê herêmê sûd wergirtin, bûn desthiladarê wê û di dawiyê de jî li ser wê kelepûrê rûniştin. Piştre jî bi erişen xwe yen hov Kurd mecbûrî çiya kirin. Heta vê pêvajoyê derba heri mezin Ereb, Asûr û Tirkan li Kurdan xistin ku wana welatê xwe terk kirin. Derba duyemîn jî dîsa ji ali Ereban ve di dema îslamê de li Kurdan ket. Wek birêz Mihotûlî dibêje, ti miletan mina misilmanên Ereb ku misilmantî ji bo şovenîstiya Ereb bi kar anîne û zirar dane Arya û ew kirine hedef tunebû.(87‘ 1951 Di destpêka belavbûna Islamê de artâşa misilmanan Kurdistan ji serîkî heta serê din şewitandin. Kurdên tekoşiyan kuş tin û yen din jî re viyan çiya û herêmên dûr. Piştre jî oleka nû bi Kurdan dan qebûl kirin ku vî olî mala Kurdan şewitand. Yanê: kêd, çand, ol, şaristanî û pêsketinên ku Kurd heta

wê demê pêk anîbûn yekser ji holê rakirin û sîstemeka nû, oleka nû, zagonên civakek nû li ser Kurdan ferz kirin. Vê ferz kirinê cewherê Kurdan wala kir û tenê navê wan ma. Bi kurtî Kurd bûn mirovên din. Ji aliyê din ve, ev guhartin di navbera Kurdan de jî dubendî û sêbendî derxist holê û Kurd ji hev re bûn dijmin. Ne tenê miletê Kurd, di nav êl û berên Kurdên ji bavekî veqetiyan de jî bû sedema nakokî û seran. Ew ola nû yê ku li ser Kurdan hatî ferz kirin, îro di nava Kurdên dervayî welat de temsîla xwe wiha derdixe hole: Ji Kurdekî li Anadolê ola wî yê kevn bibirse tiştekî nizane, mezinan nedixwestin qal bikin, lê di jiyana wan ê rojane de, mirov bi hêsanî şopa Zerdeştî, Elewîtî, Sersorîtî, Şîîtiye dibine...

Ji bo ku Kurd Zerdeştî bûn, Ereban, ew weke cinan bi nav dikirin. Vê demê Kurdên Ëzdî ji Mûsilê bigre heta Derya Spî di quntara çiyan de dijîn. Gor jêderên vê demê hinek Ereban jî gotine navê wan Sirtî-Çirtî ye. Di ber destpêka misilmantiyê de, Kurdên Sirtî li welatê Herat, Mazenderan, Xorasan û Gîlanê dijîne. Berî îslamê bazarên Ereban bajarên mîna: Yemen, Mekke, Tizfol û Dimişq-Şam bûne. Dema ew çûne wan deran rastê Kurdên bi navê Cûnûkî tên. Ji bo wê, li ba Ereban ew bawerî çêbûye ku hemû Kurd Cûnûkî ne, cin in. Ev dîtina Ereban ji nivîsa di çiyayê Golên xwê yen nezîkî çiyayê Şenga^ derketî de jî hate pejirandin. Nivîs qala êla Zaban-Zîbarî jî dike. Van Cunûkan BI di salên 2400-2500 an de li hemberî Akadiyan û hevalên wan §erê hêja kirine, rojava û başûre Mezopotamya yê kirine bin destên xwe. Di destpêka misilmantiyê de ew êla mezin ya bi navê Cûnûkî li dora Riha, Nisêbîn û Mûsilê dijiye (-Faûtûs Tarîhî, Qalaxlî Tarihî). Vekirî hatiye nivîsîn ku ew êl yan jî federasyona élan ê wê demê, ji Mûsil heta Rihayê belav dibûye û ti guman tine ku ew Ezdî ne. Iro jî li Anadoliya Navîn êleka girêdayî Reşiyan ya bi navê Cûtikan heye. Ihtîmaleke mezine, ku ew beşekî Cunûkiyan bin. Guhartina nav jî bi nivîsandin û nivîskarên erebî ve têkildare. Di serdema Sasanî û Grekan de

jî ew li bajarê Darê bûne. Yewnanî Cunûkan li: Riha, Heleb, Amîd, Nisêbîn, Nînova, Sîncar, Cizîr, Finîk, Beyt^ebabê nîşan didin. Van Cunûkanên îro li dora Enqere, Nevşehîr, Kaxizman, Bako, Selmas, Xorasan, Xuremebad, Hemedanê û Helebe dijîn. Di vê deme de ola wan ji mezhebeka Zerdeştî ya bi navê Tiraîlî bûye. Agatxangelosê Romî wê demê ji bo ola Xiristiyanî belav bike hatiye wan deran (332) û Kurdên bi navê Mamokyan-Mamokanê kirine Xiristiyan. Ereb ji welatê wan re dibejin Dar El Beran, Osmaniyan jî gotiye Beran Yurdu -Welatê Beranan (Muş, Xelat, Erdîş, Malazgîrt, Xinis).(2(,) Bi wî awayî ji wir tê zanîn ku konfederasyona élan yên ku Tirk dibêjin Qereqoyînî yê vê demê jî wek Beranî dihatine binav kirin. Lê li ser dîroka ew tê diyarkirin pêwîste mirov hîn zêde lêkolînê bike û di beşa Beraniyan de emê dîsa li ser rawestin.

Piştî hîcreta Hz. Muhammed (622), di nava Ereban de gelek şeren navxweyî çebûn. Di da wî dehêzên Fêxember bi ser ketin û li tevahiya Erebîstanê desthilatdar bûn. Karên hundurîn tevakirin bi şûnde, êdî dem hatibû îthalkirina misilmantiyê û talanê. Şere yekemîn, cîhada li hember Xiristiyanan kirin. Di sala 636 an PT de, li Yarmûk a Sûriyê di şere li hember Bîzansan de Ereb bi serketin. Piştî wî şerî, êdî deriyê rojavayê Kurdistan ji bo erişen Ereban û ji bo belavkirina îslamê derfetên zêde derdixistin holê. Rojavayê Kurdistanê bi hêz bûna Ereban re bû qada tekoşîna di navbeyna Bîzans, Ereb, Sasanî û Kurdan. Kurd bi piranî li aliyê Sasaniyan bûn, lê dîsa jî gelé heri zêde zirar dîtî Kurd bûn. Hinek ji alî Sasaniyan ve, ji bo ku pûşî li ûrîşân Hûn, Xezer û hêzên din bigirin hatibûn şandinî Huzîstan, Xorasanê. Kalê Kurdên îro li dervayê welat bi piranî li Ezerbeycan, Ermenîstana îro, dora derya Kesk, Xorasanê û Dêrsîmê kom bûbûn. Lewra ew herêmana çiya ne û ji bo parastina wan girîng bû. Bi taybet jî, tûkoşîna di nav hêzên mîna Bîzans û Sasaniyan de, herdû alî jî bê

taqet ketin û ji vê rewşe împeryalîzma Ereb sûd wergirt. Di destpêka sedsala VIII an de Ereban ji 3/2 ê xaka Bîzansa kirin bin desthilatdariya xwe.

Kurdistan Berî Ereban

Salekê piştî vê serkeftina Bîzansan, Ereban edî erîşî Kurd û Farisên Zerdeştî kirin. Arteşa Ereban di sala 637 an de, di bin serokatiya Kaak Ibn-Amr de bajarê Hulwan bi zorê heynan. Hulwan bajarekî stratejik bû û dikare ji erişen Ereban re bibe deriyê yekemin. Al-Balazûrî dibêje: Pişti Hulwan, Ereban erişi Şehrîzor kirin le bajar di sala 642/43 an de hate zeptkirin. Ev ji tê wê watê ku Kurdan gelek li berxwe dane.l3'2Z) Di hem an sale de hêzên Ereb û yen Kurd-Farisan li Kadîsiye hatin hember hev. Bi ârîşek ji nişkeve û bi germ negirtina torinên Medan re, Ereb bi serketin û hovitiyeke mezin nişan dan. Paytextê Sasaniyan kete deste misilmanan. Edî piştî vî şerî ji deriyê Medya mezin ji Ereban re vebû. Talan, komkujî û çanda Kurdan bi hezar salan di bin agirê Ereban de şewitî. Farisan şer winda kirin bi şûnde, êdî bi temamî teslimi Ereban bûn. Lê Kurdan, li dijî vê zürne ti caran serî netewandin; tekoşiyan, mirin û yen din ji vekişîn heremên dur û yen çivayî.

Di sala 697 an de gelé Eğrisi yê li dij Bîzansan serî hilda û hewara Ereban kirin. Armanca Ereban ji rêya Xezeran girtin bû da berjer neyên. Xezer, di alî leşkerî de pir bi hêzbûn. Him Ereb him ji Bizans ji wan ditirsiyan. Ev dewlata di navbera Çemên Don û Volga û di navbera Derya Reş û Derya Kesk de bû.<62)

Li ser wî gêlî Neal Ascherson dinivîsîne ku: Xezerî bi tirkî diaxifîn. Ji Asya Navîn PI derdora salên 700-800 hatin û li peravê Derya Reş împeratoriyek çêkirin û Qirim jî di destê wan de bû. Beri hatina Xezeran mintiqa Derya

Reş di nav aştiye de bû û ji wî re riya Derya Spî vekirîbû; bi hatina wan re ew jî xitimî. Lewra hersai ji bajarê Qirim 1500 dîl ji Memlûkên Misirê re diçûn. Kipçak jî ji Asya di salên 1000-1100 de hatin stepên Pontûs.(7h) Li ser Xezeran û dîtinên Ascherson gumanên min hene: beri hertiştî çima nave wan Xezer e? Piştre Xezeran niha li Afganîstanê bi zimanê Derî diaxifine û wan çima zimanê xwe guhartin? Îttîfaqa wan û Saka li ser çi bingehan bû?

Bi hatina Ereban ya Kurdistan û Iranê re, li Kurdistanê qedexa ol, çand û kevneşopiya kurdî jî destpê dike. Talankerên Ereb, ji bo ku şopa vê çandê ji holê rakin her der şewitandin û di nav wan de li bajarê Şehrîzor û Medya 250 hezar pirtûkên ku dîroka Kurdan jî di nav da şewitandin. Iro mümküne ku Kurdên bûne misilman vê yekê qebûl nekin û li dilê wan neyê, lê em nikarin ji rastiyê re çavên xwe bigirin. Parçeyek ji vê rastiyê di sala 1882 an de ji aliyê Emerîkayîkî ve li çiyayê Suleymaniyê di şikevtekû de tê dîtin. Helbesteka bi zaravê Goranî yê û helbesta Kurdan ya yekemîn e.

Helbest wiha ye:

Hurmuzekan Reman atran kejan YVîşan şarde we gewre gewrekan. Zorkarê Ereb kerdne xapûr Kenayê pale ê heta Şarezor.

Şino kenîkan we dil beşînan Mird azatlî ji rûyê hewîna Rew§tê Zerdeşt re man we bê kes Bezîka nîka Hürmüz we hewîç kes.

Kurmancî jî wiha ye:

Hurmuzdegahan mizgeft hilşandin û agir vemirandin Mezine mezinan tunekirin û wenda kirin.

Zorkarên Ereban gund heta Şarezoıû wêran kirin.

Jin û keç û dildaran hemû zebûn kirin birin.

Edî azadî ji rûyê kesî evîndar miriye nemaye

Ke§ê Zerdeşt bê kes maye

Hürmüz êdî li tu kesî dilovanî nake.(32)

Musil di sala 640 an de hat bidestxistin û Ereb li vir hatin bi dh kirin ku ma vê heremê birşînin û hiçinin û gelek Kurd jî berbi bakûr ve re viyan. {3'20) Wekî min li jor jî nivîsî Kürden Cûnûkî diviyabû hê jî li vê herêmê biyana ku êdî ew jî berbi Ezerbeycanê hilkiştana. Lê şere li Medya giran pdşve diçû, sede- ma vê jî berxwedana Kurdan û coğrafya çiya bû. Bi ser vê de Yezdîgerd III an biryara (642) şerekî din da. Ew şer ji bo Ereban jî, ji bo Mediyan jî girîng bû. Şer li Nehavend bû, serleşkere Ereb Nûman îbn Makarrîn mir, lê biraw wî derbasî şuna wî bû. Di dawiya wî şerî de jî Ereb bi serketin û heta Hamadan çûn.(3‘21) (hinek jî dibêjin 640/66-76) Di vî şerî de 110 hezar kes mirin.(44) Xelk reviya ser çiyayan.(3fS) Di vê salé de Hamadan ketê bin destê Ereban û xelkê bajêr koç kir. Gor Firat: di dema xelîfe Orner de şere Kadîsiyê bû, di wî şerî de Ereb dîsa bi serketin û Iran bi temamî dagirkirin. Tirkên (mebesta wî Kurd in) çiyayî yen Haltî Lohorto, li çiyan derbasî tekoşîna bi salan bûn. Gelek mîrîtî û dewlet li wan çiyayan damezirandibûn lê herî dawî teslîmî Ereban b û bûn/127'31

Gorî ku Al-Balazuri radigihîne, xelkê Şehrîzor gotiye serleşkere Ereb Utba Tbn Farkad, Şehrîzor (642-643), Samgan û Darabad ji destê Kurdan girt. Gelek ji wana kuştin, ew bi bacê giredan û heta Ezerbeycanê kire bin desthilatdariya xelîfe Omer. Edîp Yavûz jî dibêje: Emewiyan ji xelkê gelek bac diştendin. Di nava wan de baca "Newrozê" jî hebû. Cor rîwayetê Mûaviye (680) ji xelkê Sevad (xelkê herî kevne li herêma alîvyonê di navbera Dîcle û Firat de ye) baca Newrozê û Mihrîcanê xwestiye, wan jî 10 mîlyon dîrhem pûşkeş kirine.(105‘24) Xelkê bi navê Sevad îhtîmaleka mezine ku kalên êla bi navê Sewêdî ya îro li Anatoliya Navîn e...

Di navbera salên 644-656 an de Xorasan bi temamî ketê bin destên Ereban. Birêz Bûlût dibêje: fetîh kirina Xorasanê (649) di dema xelîfe Osman de ye. Serleşkere Ereb Ahmed bîn el Yeşkûrî dema hat bajarê Xorasan Belhê, dît ku xelkê cejna Mîhrîcanê pîroz dike/36) Gor min jî ew tespîteke rast e, lewra Kurd Zerdeştî bûn û ji ber vê jî misilmantî qebûl nekirin û vekişîn Xorasan. Xorasan ji wan re ne xerîb bû; lewra bav û kalên wan qal kiribûn ku Xorasan qada berxwedanê û warê wan e. Ew jî kalên Kurdên îro li dervayê welat dijîne. Ji bo wê jî em dikarin bi hêsanî bibêjin, ku kalên Kurdên îro li Anadol, Xorasan, rojavayê Kurdistanê yen vê demê li wir û Ezerbeycanê bûn...

Li Xorasan gelek serhildan, tekoşîn û komkujî pêk hatin. Emê di beşa Xorasan de jî li ser rawestin lê di vê demê de em dibînin ku Kurd bi Tirkan ve li hember Ereban hevkariyê dikin. Tirk, di dema desthilatdariya Tûrgîş de, yanî di sala 716 an de hatin Xorasan. Ji tekoşîneke 20 salan şûnde Tirk belav bûn. Saïd bîn Amr el Haraşî, waliyê misilmanan yê li Xorasan bû; ji bo ku bi Tirkan re hevkarî kirine xelkê wir di salên 721-22 an de di şûr de derbas kir. Walî yê berî wî jî Yezîd bin Mûhelleb bû ku bi xwîna gelé wir kevirên aşan gerandin... 40 hezar mirov kuştin. Ji ber zordariya wan jî xelk cîhên xwe terk kirin û çûn çiya. Emewiyan li xelkê gelek zulm kirin û siyaseta koçberiyê dane

dest pêkirin. Ji bo ku Xorasan bûbû keleha berxwedana muxalifan û ji alî aborî ve jî gelek hatina wê hebû. Ji bo ku ji hukumeta navendî dur bû, xelk direviya wir û xwe vedişart.(36)

Nivîskarê Ereb Taberî axaftineka di navbera xelîfe Omer û kesekî de wiha radigihîne: Omer dibêje; Xwezî di navbera me û Xorasanê de behrekî ji agir hebûya! Kesê din dibêje, çima? Dibêje, şûna ev xelkê li wir (Tirk) were ser me, bila here ser xelkê herêmê (Kurd).<36) Ew jî îspateka din e, ku berî Islamê Kurd li Xorasan nişteçîh bûnê. Ev xelkê Kurd û Farisên li wir

dijîn heta salên 720 an li dijî Ereban li berxwedan. Kurdên vê herêmê ji xelîfe Orner û Emewiyan zordariyeka bê hed dîtin. Ji ber vê ji Tirkan alîkarî xwestin, gelekan cîhê xwe terk kirin û çûn serê çiyan û beşek jî çû Hîndîstanê.

Ereban; Rey, Kûmiş, Teberistan, Xorasan, Kerman û Sîstan wergirtin. Ji wira jî erîşî ser Ezerbeycanê kirin û rastî berxwedaneke pir dijwar hatin. Xelkê wir bi piranî Kurd bûn. Peyman kirin û gorî vê pêwîst bû ku ji salé 800 dîrhemî bidine Ereban û li hemberî vê jî Ereb ê xelke nekujine, dîl negire, bawergehên wan xirab neke, xelk ê bikaribe cejna xwe bi azadî pîroz bike û ti mudaxele neyê kirin... Pêwîst bû ku ûrîşî Kurdên Balasancan (Begasakan), Sabalan (Sabilan) û Satrûzan nekirana (643-644). Ew navên Kurdan jî balkûş in: Beg-ê-Sakan, Saka-bilan, Saka-Rûzan. Ji van navan jî diyare ku ew berdewamiya Saka ne. Tê nivîsandin ku Kurdên Gîlan, Teberistan, Dîlmistan, Qazwîn, Mazenderan ji ber misilmanan reviyane. Ji desthilatdariya Ereban ya li Mûsilê bi şunde gelek Kurdan ji vir koçî Ezerbeycanê jî kiribûn. Ebdûllah Varlî dibêje; gava Deylemiyan ji ber misilmanan reviyan, li van deran bi cîh bûn. Di sala 258-274 (divê gor salnama kevn be) an de, di pey koçê, ew li Arran bicîh bûne û nivîskar li wan deran ditîne, wekî Ibnî Hewqel, Tarîxê Iran Mufessel Ebbas Iqbal, Yakût el Hernewî û yê din gotiye ev Kurd in.(32) Hîna jî Kurd li wan herêmana hene. Ev hemû mînak jî nîşan didin, ku Kurd çawa ji welatê xwe, piştre ji Qefqasya û Xorasanê jî derketine û bela-wela bûne. Bi vî awayê şopa Kurdan ku îro li wan deran tê dîtin ne tesadüfi ye. Tewgerê Kurdan gelek bandor jî li ser çand, jiyan, kinc, cihêz hwd de li ser gelên herêmê kirine û kevneşopiya cejna netewa Kurd Newrozê ku li wan deran tê ditin jî ji van Kurdanan ma ye.

Tê idea kirin ku Kurdan di sala 639 an de, Tirkan jî di sala 751 an de misilmantî pejirandine.<39) Mamoste Bender jî dîtineke din fine: Kurd û

Farisan bi dehsalan li hember misilmanan şer kirin. Tirkan jî di dema Şelçûq de misilmantî bê şer û pevçûn û komeka ji ulemayên îslam qebûl kirin şûnde, bûne misilman. Bi vî awayê wek Kurdan nebûn. Tirkan di sala 930 an de misilmantî pejirandin. Yanî: 296/266 salan piştî Kurdan.(123'94) Mesûdî jî dibeje, berî Kurd misilman bibin di navbera wan û prensê Ereban yê bi navê Gassanli de doza xwînê hebû û cara yekemîn Kurd bi Erebên misilman ve di sala 637 an de, ji dagirkirina Ereban ya Tikrît û Hulwanê şunde bû. Li dijî Ereban gelek cara îttîfaqa Kurd û Farisan bê dîtin jî, zora Ereban nikarin bibin û Kurd jî hemû yekser nebûn misilman. Ew idea ji bo beşekî Kurdan, bi taybet jî ji bo

yen nişteçîh dikare rast be, lê ne hemû Kurdan. Fêwîste ev yeka li navenda Kurdistanê piştî şere 640 an bi şûn ve bê. Lewra hê Kurdên navenda Kurdistanê li hêviya serkeftinê bûn. Ji bo bakûr jî divê sala 645 an de be. Mirov dikare bibejê ku pişti van şer an û têkçûna Kurd û Farisan, Kurdên navendê û bakûrê Kurdistanê ji neçarî misilmantî pejirandin.

Wekî min li destpêkê de jî nivîsî, imperyalîzma Ereban zirarêke mezin da Kurdan. Mirov dikare bibêje ku Kurdistan hema hema vala bûbû. Kurd bi piranî berbi Xorasan û bakûr û bakûrê rojhilat vekişîn; di beşen Xorasan û Tirkmenan de emê bi dirêjî li ser rawestin. Hinek ji wan jî Kurdên Zerdeştî yen li Medya bûn ku di sedsala IX an de kom bi kom çûn Hîndîstanê. Li wir bi navê Parseeler tên nasîn û vana wextê kesek dimire li cîhekî bilind dihêlin ku teyr bên Ci gostên wan bixwin û hêstî jî di cîhekî de vedişartin.(159'163) Bi vî awayê Kurd, bi piranî li sînorên Medya berê yen herî dûr belav dibûn.

TJ hember zilma Ereban, di sala 745 an de, di peşengiya Misafir ê Bilekan de, gelé bakûrê Kurdistanê dîsa serî hilda. Rêvebirê Bilekan, Asim ê girêdayî Xelîfê dît ku rewş xirabe, artê§ komkir. Bi ser vê de Misafir erîşî bajêr kir û Asim kuşt. Xelîfe Merwanê II an arteşeke din şand, Misafir ew

jî têk bir û ew herêman heta dema Eba Muslim di desten Misafir de bû.(101'29) Ji Omeiê II an şunda, Tbn Merwanê (744-750) diya xwe Kurd hat ser textê Omeyidan (malbata xelîfe Osman). Navenda antî-Omeyidan jî Kurdistan bû û ji têkçûna Merwanê li Zê şunde Kurdistan ket bin desthilatdariya Ebbasiyan. Di dema xelîfê Emewiyan Merwanê II an de li hemberê Xariciyan şerek bû, di wir de beşekî ji Kurdan piştgiriya xelîfe kirin; ji bo ku diya xelîfe Kurd bû. Xelîfê Ebbasiyan Mansûr (754-775) jî jina xwe Kurd bû. Di sala 839 an de li herêma Mûsil mîrê Kurd ê bi navê Faharcisê kurê Cafer serhildaneke mezin pêk anî û fermandan? Tirk ê bi navê Aytan jî di sala 845 an de li Faris serhilda, Tirkê bi navê Vasif serhildan têk bir.(44) Bi vî awayî Tirkan, hêz li ku didîtin diçûn aliyê wan û bi hêza wan ji xwe re rê vedikirin. Ew ne tenê di alî eskerî de pêkhatiye; dema peşbroja ola îslamê di berjewêndiyê xwe de dîtin, hema misilmantî qebûl kirin. Ji bo vê jî tê dîtin ku carna wek fermandar li peşiya eskerên misilmanan in, carna jî wek esker bi wan re ne. Lê divê bê zanîn ku ji bo berjewendiyê xwe ol û hêza wî bikar anîne.

Li bakûrê rojavayê Kurdistanê, herêma ku kalên me bi piranî lê dihatin ditin jî arteşa Ereban bûbû sedema gelek kuştin û koçberiyê. Bajarê Meletî di sala 756 an de ji alî xelîfe Mansûr ve dîsa hat avakirin; bajarekî pir dewlemend bû, lê bi drîşân Bîzans, Ereb û Moxolan xirab bûbû.'481 T^têkî balkûş jî di sala 765 an de qewimiye, di vê salé de Ereban sîxurê xwe şandine nava Roma û ew hatine girtin. Bi ser vê de arteşa Ereban diçe li deşta Germanîkê (Mereş) bi cîh dibe. Xelkê li wir dijiya dîl girtine û şandine Ramlê (?); dîsa xelkê Samûsata (Seinsûr) jî şandin wir.(4S) Ramlê kuder e nizanim, lê gor texmîn dikim li derdora Ezerbeycanê ye. Lewra Piraniya êlên Kurdên di dem û ji cîhên cûda hatine li wir kom bûn û piştre ew yeka veguhezî dewletekê. Lewra Kurd vê

demê bi piranî di nava tevgerên muxalîf û dijber de bûn. Yek ji wan tevgerena jî Xaricî bûn.

Gor belgeyên Serfermandariya Arteşa Tirkiyê, di dema imam Elî de, di salên 656-661 an de li rojhilatê xelîca Basra serhildanek çêbû û di nava wan de Kurd jî hebûn.(44) Ne dûre ku ew Kürden Lor bin. Wek tê zanîn di dema imam Elî de gelek Kurd û Erebên şîa û hêzên muxalif li hember paytexta xelîfetiye serî hildan. Bi piranî ji wan re Xaricî digotin. Ji ber ku ew dervayê sîstemê bûn û Imam Elî jî mexdûr e sunniyan bû û li dijî revêbiriya sîstemê xuyadikir. Lewra dema Hz. Mihemmed wefat kir, wesiyet kiribû ku Elî li cîhê vvî rûne. Lê Ebûbekir, Orner, Osman û yen din nehîştin, bi xwe li cîhê Pexember rûniştin. Ji ber vê sedemê Elî mexdûr bû û rastî neheqiyê hatibû. Lê divê şaş neyê fêhm kirin, Elî ne li dijî sîstemê bû, tenê li rêvebiriyê cîh nedanê û ji bo wê jî, ji xelkên mixalifên misilmantiyê piştgirî wergirt. Ew bû sedema gelek nakokiyan, di nava Kurdên Elewî de jî dubendî çêkir. Wê demê tevgera cîddî ya li hember misilmanan ew Xariciyan in. Motor û hêza vê rêxistinê jî Kurd in.

Sala 876/77 an de serokê Xariciyan Müşavir Aş Şarî mir. Tê gotin ku serokê Şadiyan, Daysam îbn îbrahîm al-Kurdî, ku bavé wî jî Xaricî bûye û hevalê serok Harûn Aş-Şarî ye. Xaricî çûn cem Muhemmed îbn Hurzade yê Kurd ku bixwe li Şehrîzor bû û jê xwestin ku ew bibe serokê wan. Wî berê nexwest bibe, paşê Harûn Al Bagyalî Aş Şarî bû serok. Piştî ew pêk hat jî Hurzade xwest bibe serok û ev yeka bû sedema şerekî di navbera Xariciyan de. Ibnî Haldûn dinivîse ku: Hurzad bi Harûn ve li Mûsil gîhîştin ber hev. Lê nişteçîhân bajêr aliye Harûn girtin û Hurzad bi hinek Kurdan ve bi serê xwe ma. Harûn ûrîşî wan kir, Hurzad mir û Kurdên Al-Celaliya jî belav kirin. Bi vî awayî Hurzad heta Mûsil çû, lê îxaneta alîgirên wî bû sebeb ku di şer de têk biçe. Harûn Aş Şarî di sala 896 an de serî hilda, artûşa xelîfe Al Mutadîd ew perçiqand û asî çûn Ezerbeycanê.'3'56' Di vê

jêderê de ji bo Kurdên li dervayî welat sê niqtên girîng hene: Yek, di vir de vekirî tê gotin ku Kurdên Celalî; ku ew kalên Kurdên îro ên li Anadoliya Navîn, rojavayê Kurdistan û Xorasan û gelek cîhên din dijîne ne. Dido, wê demê ew li Şehrîzor dijîne û serokê wan Hurzad e. Sêyemîn jî, ew belav bûne... Çima li Şehrîzor bûn? Bersiva vê Edmûnd R. Leach dide: Rewandûz (Şehrîzor) cîhekî pir asê ye, pir zahmete ku mirov xwe bigihîne wê derê. Tenê rêyek heye, ku ew jî bi direjiya newala Rewandûzê ye û di bin kontrola êşqiyan de ye. Rewandûz ji behrê 925 metreyan bilindtir e, lê li alî Iranê ew cama dibe 3700 metre. Mintiqeka bi av û hênike, ji ber wê, wextê mirov bi çolên Mezopotamya ve muqayese dike dijberiyeke mezin dibîne. Mintiqe li ser kaxiz di bin desthilatdariya Tirkan de ye, lê begên herêmê jiyana xwe serbixwe didomînin. Piştî şer herêm ketê bin destê Traqê. Li Rewandûzê, di navbera Rayat û Celalî de qişleyeka eskerî ya mezin hate damezirandin.(140'23) Di vir de niqta balkâş ewe, ku hîna jî li mintiqê cîhekî bi navê Celalî heye. Navê Celaliyan ku di dema Osmaniyan de jî bi kar dihate koka xwe ji vir digire...

Pîştî şene Kurd-Xarid û arteşa Ereban ya li herêma Mûsilê, em örîşeka Kürden Şadî-Celaliyan li ser vî bajarî dibinin. îhtîmaleka pir mezine ew bi armanca tolhildanê pêk hatibe. Li ser vê Ansîklopediya Islamê dinivîse ku; di sala 906 an de Kürden Hazbanî di bin serokatiya Muhammed B. Bilal de Ninova xirav kirin. Waliyê Mûsil Allah Hamdan ew taqîp kirin û di şere li Ma'tûba de têk çû. Xelîfe hêzên zêde şandin û sala din dîsa ketin dû 5 000 hezar malbatên Kurd. Vê care Kurdan xwestin aştı bikin û bi vî awî dixwestin wext bi dest bixin. Kurd vekişîn Ezerbeycan. Hazbaniyan bi tevlîbûnên teze hêza xwe zêde kirin. Allah Hamdan dîsa erîşî wan kir û mecbûnê teslîmbûne kirin. Piştre êla Humaydî û xelkê Cabal Dasîn koçber kir.(14210)

Şehrîzor, yane bajarê zorê bi navê Rewandûz jî tê zanîn. Rewandûz bi êla Şadî ya bi nav û deng ve jî jihev naqetin. Lewra di pâşengiya Şadiyan de li Ezerbeycanê dewleta Şadî-Şeddad ava bû ku îro torinê wan ên li derveyî welat in. Dîsa, li Qefqasan bajarê bi navê Rêwan jî alî heman konfederasyona êlên Şadî ve hatiye avakirin. Wekî me gote, Rewandûz-Şehrîzor keleha Kürden asî ye. Keleha berxwedanê ye, çend caran artâşa Ereban bi hezaran esker ârîş kir û şeren bi xwînî pêk hatin. Hesnewî kurê Huseyn ku yek ji mezinen Şehrezoıe bû, di sala 981 an de ala azadiye li Demar û Şehrîzore bilind kir. Xelîfê Bexda çar caran arteş şand ser Hesnewiyan, lê wan her çar caran jî artêç şikandin.(9‘160> Cîhê stratejik bi şervaniya Kurdan ve, arteşa Ereban yê ku împaratoriyan nedi- karî li hember bisekinin, kalên Kurdên li derva têk birin. Lê mixabin di dawî de ew jî têk çûn û riya Arran girtin. Gelek nivîskar û jêder êlên li vê herêmê ji me re radigînin.

Gora nivîskar û gerokên Ereban, di sedsala X an de li Ezerbeycanê gelek êlên Kurdan hebûne. Ji w'an élan gelekê girêdayî Şadiyan bûn ku ji wan re Celalî jî dihate gotin. Celalî navê giştiye, ji hemû êlên serhildêr û teslîm nebî re tê gotin; Şadî jî konfederasyon û dewleta ku élan avakiriye ye. Nivîskar û gerokên Ereb dinivsînin ku li Ezerbeycanê êlên Kurdan ye mîna; al-Barziniya (Barzikan), al-Ayşaniya, aş-şazaptjan, al-Kauhiya dijîn. Ibn Xurdad bin jî lîsteyeka hukumdarê li Xorasan dide û qala nav û dengê wan dike: Prensê Nesa şa^ Abraz; Prensê Xoristan Baraz-Bandeh; Prensê Herat, Buşanc û Badgisê jî navê Barazan bi kar tanîn. Yanî her yekî şanö Baraz bi kar tanî. Wekî tê zanîn di kurdî de peyva 'birêz' heye ku dema xîtabê bi kar tê û êleka bi navê Baraz/Berazî jî heye. Mumkune ji van yekî, ji van navan re bingehî kiribe.

Al Masûdî (943) êlên Kurdan dinivîse lê cîhe wan nabêje. Di sedsala X an de li: Fars, Kerman, Sîstan, Xorasan, Nîhavend-Cîbal, Dînaver, Hamdan,

(Kermanşah,) Şehrîzor, Darabad, Samafan, Ezerbeycan (Derbend), Cizîr, Sûriye (Şam), Sugura (sînorê Ereb-Bîzans) van êlên Kurd dinîvîsîne: Bazincan, Şuhcan, Şazîncan, N aşa vira, Buzikan, Luriya, Curkan, Cavaniya, Barisyan, Calaliya, Mustakan, Cabarika, Curgan, Cabarika, Kîkan, Macurdan, Hazbaniyan (Mûsil) dinivîsê. Li Sûriyê Dunbilî, navbera Mûsil û Cudî de Yakûbiye û Cûrkan dijmêre.(3'92) Navbera Mûsil û Ararat de Yakûbiye û Cûrkan û nêzîkî

wir Hamidiye-Merwanî dijîn. Dîsa li dora Mûsil Kîkan, Maraniya û Bohtiya jî dijin.(393) Li Ezerbeycanê Hezbanî û Sarat (şûrat=Xaricî); li Cîbal Şadî, Lûr- Lazba, Madanyan, Mazdanakan, Barisan, Xalî (Celalî), Bûzikan û Kîkan li dora Merdin.(2 W) Mînorskî dibêje Sughur li dora Kîlîkya ne.

Masudî (332=943) yê ji Bexda van êlana dijmêre: Li Daynavar û Heme-danê Şuhcan; li Kangavar: Macurdan; Ezerbeycan: Hazbanî û Sarat, hîna jî li xwarê Şadacan, Lazba (Lurrî?), Madancan, Mazdanakan, Barisan, Hali (Cel¬alî), Cabarkî, Cavanî, Mustakan. Li Sûriyê: Dababila; li Mûsil û Cûdî Kurdên Yakûbî yen xiristiyan û Curkan (Curugan). Iştîharî jî vana lê zêde dike: Naşavîran, Buzikan û Kîkan (niha li dora Mereşe ne). Bi vê re cîhên ku berê Kurd lê dijin jî dinivîse: Fars, Kirman, Sicistan û Rûmum ên li Xorsan û Istîşarî gundekî li Asadabad ê û beşek ji êla Bazancan ê li bajaiê Esfehanê li bajarekî bi navê Kurd de dijî lê zêde dike. Ew nivîskaran dibêjin li gelek deveran û li Hemedan, Şahrîzor, Ezerbeycan, Ermenîstanê Kurd di xaniyên kerpîç û kevi- ran de rûdiniştin. Mûkaddasî jî dibêje: Li Arranê deriyê cografîk yeki navê xwe Bab al-Akrad bû. Tbn Miskavayhî jî: dema Rûsan di sala 943 an de herêm îstîla kirin di emrê waliyê herêmê de Kurd hebûn.

Li herêma Farsê jî 33 êlên koçber ên Kurd hebûn. Gor îdea Farsname (500=1107) di artûşa Farsan ya kevn de ramm(koma) heri mezin Kurd (Cîloya=Kuh Gakı ye îro Lor rûdinin), Zîvan, Lavalîcan, Kariyan û Bazancan)

bûn, lê vana di dema Islamê de ji holê rabûn. Kurdên din ji alî Azud al-Davla ve ji Fars rakirin Esfehanê. Ji holê rakirina 500 000 malbatî qebûl kirin zahmet e, lê mümküne ku vana asîmîle bûne yan jî di nava êlên Fars de wenda bûne.|l42'7) Gorî Fars-namê (1107 PÎ) Kurdên heri bi nav û deng ên ku vê demê di nava ariûşa Iranê de cîh digirtine; wek, Ciloya, Zavan, Lavalican, Kariyan û Bazancan in û bi şere di dema Islam de ji holê rabûn (500 hezar malbat).(5,) Ihtîmaleka pir mezine, ku ew çûn Xorasan an başûre derya Kesk.

Dîsa Mesûdî di sala 943 an de di pirtûka xwe ya bi navê "Mûrucûz- Zehep" de dibêje: Li dora Dîcle Çuruhan dijîn ku hinek ji wan bûne xiristiyan û bi Xalaçan ve cîran û birane. Vana misilman in û girêdayî Kîkî ya ne. Kîkî-Khalaçan ji berê ve, di navbera Mêrdîn, Amed û Riha de dijîn. 24 êlên girêdayî Xalaçanê Kurmanc jî şaxekî wan in û ji berê ve li Malazgîrt dijîn.(128'27) Di vê serdemê de tê dîtin, ku hinek êlên li Qefqasan jî xiristiyanî pejirandine, lê li ser vvan agahiyên berfireh mixabin nînin.

Birêz Xemgîn ji belgeyên dîrokî navê gelek êlên Kurd radigihîne, wek: Tammanî (Bothan), Namrî (sala 900 BI), Kullar (îro Kurkur-Gurghur) li Darban-î Ramkan dijîn, Sumbiyan li Qele Diz bûn. Ji bilî wana hinekan jî tenê nav derbas dibin: Memikan, Boxîran, Reşgatan, Mendikan; li Iranê jî: Baban, Mukrî, Mussassir, Ider, Dağara, Kurulla, Altabrîa, Kîrrur bûn.(4190)

Herçiqasartê§a Erebên barbar li Kurdistanêiêli gelek kuştinû wêraniyan vekiriye jî, bixwe jî lawaz bû. Ji vê rew§ê Bîzans sûd wergirt. Di sedsala X û XII an PI de, ji lawazbûna arieşa misilmanan îstîfade kir û dîsa berê xwe da

rojhilat. Sînorên xwe heta Qefqasan dirêj kirin. Di vê belavbûnê de Kurdên misilman hemî kuştin, yan jî koka wan kolan. Bîzansan (963-969) İİ rojavayê Firat, Kizilirmak, rojhilatê Torosan, Kommagene, Kapadokya,

Pontûs û Sûriyê Kurd ji kokê xwe veqetandin. Şuna Kurdan Ermeni û Aramiyên xiristiyan bi cîh kirin. Mümküne xiristiyanî qebûlkirina Kurdan jî li ser wan esasan be. Ya ne ji tirs û erişen Bîzansan ew mecburî vê kiribin. Lewra dem û cîhên xiristiyanan girtine û polîtîka wan vê yekê derdixe holê. Abûl Farac dibêje: Di salên 1035 an de Roma tim erîşî Riha dikirin. Waliyê Fiarranê jî kurê Vatab ê mensûbê Nûmeyîran bû. Romiyan erîşî Riha, Harran, Aksas û Serugê (Sîweregê) dikirin û talan dikirin. Vatab baç dayin pejirand û bi ser vê de Romiyan erîş nekirin. Vatab ji Kurdan û ji kurên Maadan (yanî ji koçberan) arteşeke mezin çêkir û erîşî Roma kir. Sîbabarak heyna û 3500 zilam kuştin û jin bi zarokan ve dîl girtin.(4y) Bi navkirina Kurdên koçber balkeş e, ji ber vê sedernê hêjayê lêkoiînê ye.

Bi vî awayî Kurdên ku li ser rêxistina êlî jiyana xwe dom dikirin, ew qaliba neşikandin, lewra êlên Kurd pir bi hêz bûn, lê têra dijminan nedikirin. Ji bo vê jî, ji her alî ve rastî ê^ên dijminan hatin û bi hêsanî belav bûn. Ev yeka di her serdemê de pêk hatiye. Ji serdema Asûr bigre beta dema Xelkên Deryayê, Ereb û Bîzansiyan. Dema Kurd yekîtî çêkirine jî dewletên mina Şadî û Imparatoriyên mina Medê ava kirine. Piştî serdema Emewiyan ya bi xwîn, rengekî din ên Ereba ya bi navê Ebbasî hatin ser texte xelîfetiyê. Di serdema wan de jî rewş çûda nebû, lê piranî bi helwest û yekîtiya Kurdan re girêdayî

bû.

SERDEMA EBBASIYAN (749-1258)

Bê gu man hemû dîroka Islamêji bo Kurdan gi ringe; lewra vêîdeolojiya nû bi her awayî hestiyê pişta Kurdan şikand. Dîrok, ol, çand, desthiladariya Kurdan xira kir û Kurd wekî hemû desthilatdarên din ji hev qetandin û ji bo sîstema xwe kirin mertalên parastinê. Ji bo vê, girînge ku dîroknûsên Kurd, li ser vê dîrokê bi şeweyekî kûr û ciervayê dîrokên fermî yen dagirkeran rawestin û ji nû ve binivîsîn. Di vê beşâ de, emê bi taybetî

li ser serdema Ebbasiyan rawestin. Sewa ku Ebbasiyan li destpêkê Kurd wek §irîkên desthilatdariyê bi kar anîn; pişt re jî zivirîn ser Kurdan û ew kuştin; bi darê zorê ew koçber kirin û xwestin asîmîle bikin, Pêwîste mirov vê jî binivîse; ku eğer Kurd nebana Ebbasiyan ti caran nedikarîn desthilatdariya Emewiyan têk bibirana.

Wekî me li jor jî got; pêxemberê misilmanan li ber mirinê wesiyet kir ku bila li cîhê wî îmam Elî rûnê; lê malbata Omediyan destûr nedan vê yekê û di nava wan de nakokî û şere berjewendiyê destpêkir. Di dawî de, bi dor ew xelîfe hatin ser kar:

Ebû Bekîr : 632-634 Xelîfe Orner : 634-644 Xelîfe Osman; 644-656

Xelîfe Elî : 656-661

E. Cemîl Paşa dibêje; di sala 646 an de Osman bû Xelîfê Islamê. Pey Osman di navbera Ereban de pevçûnen dijwar pêkhatin. Di dawiyê de Muawiye Ibn Ebî Sufyan bû xelîfê çarîn. Xelîfetiya Emewiyan 89 salan ajot û di sala 759 an de dawî lê hat.(9157) Di dawî lê hatinê de rola kalên Kurdên îro li dervayî welat bingehîn e. Di peşengiya Eba Muslimê Xorasanî de, Emewî têk biribûn. Ew Kurdên îro li navênda Anadolê, bakûr rojavayê Sûriyê û rojavayê Kurdistan neviyên wan Kurdên bi Eba Muslimê Xorasanî ve li hember Emewiyan têko§în dane. Yanê bapîrên Kurdên li dervayî welat bûn. Xelîfê Ebbasiyan yê yekemîn Ebu-1 Ebbas Abdullah (749-754); yê duyemîn jî Ebu Cafer el Mansûr ê ku di sala 755 an de Eba Muslim kuşt.<36) Kurdên ku li Qefqasya û navenda Xorasanê kombûnî, heta dawî dijberiya misilmantiyê kiribûn, bi rêberiya Eba Muslim vana desthilatdariya Emewî rûxandin û rêvebiriya Ebbasiyan hat ser textê xelîfetiyê. Lê pir neçûbû ku vana jî rûyê xweyî dijminatiyê aşkere kiribûn ku dîsa tûkoşîn kete para Kurdan.

Kurdên ku dijîtiya misilmantiyê dikirin yên li Riha, Amed, Meletî, Adiyaman, Mêrdîn, Nisêbîn, Sêrt, Xelat, Mûş, Malazgirt, Erdîş û Çewlikê rûdinişt in. Van Kürdana ji Emewiyan re alîkarî kirine û keça xwe dane serokê Emewiyan yê dawî Merwan, ku diya wî jî Kurd bû.(32) Eğer ev îdea rast be, wê demê, di wê bûyerê de Kurd bûne du beş. Beşâ yekemîn E. M. Xorasanî pêşengî dikir ku li Xorasan û Qefqasya bûn û li dijî Emewiyan şer dikirin. Beşa din jî alîgirê Emewiyan ên ku Merwanê çavşîn xwarziyê Kurda ye. Ew dubendiya gelo li pûşerojû bû sedema cûdahiyên mezin an na? Fêwîste dîroknûsên Kurd vê yekê derxin holê. Wek mînak, mirov dikare bipirse û bibêje gelo di bingeha ji hev veqetîna Pezgewr û Pezreşan (Beraniyan) de sedema herî mezin ew bû an na? Mirov dikare pirseke bi vî rengî jî bike: Gelo Kurdên nişteçîh aligirên Emewiyan û yên koçber jî alîgirên Ebbasiyan bûn?

Di serdema dawiya Emewiyan û destpêka Ebbasiyan de, gelek şemn bi xwînî yên Kurd û Ereban em dibînin. Di dawiya van şerane de, bi zorê koçbe- riyeke Kurdan yê mezin pêk tê ku ew heta roja îro li ser me û dîroka Kurdan bi giştî bandor hiştiye. Bi vî awayî li destpêka Islamê Kurdan zirareka mezin dîtibûn û di merhela duyemîn de jî, di destpêka Ebbasiyan de Kurd bi zorê li gelek cîhên ji hev dûr hatin bi cîh kirin. Li ser vê koçê Doç. Yilmazçelîk dibêje: ji Xorasan û Turkîstanê, di salên 756-760 an de gelek Tirk (di esas de ew Kurd in-Ş) anîn li rojhilatê Anadolê bi cîh kirin.(ll613) Waliyê Cizîrê Abdullah Îbrahîm bi fermana xelîfe Mansûr li Meletî û dîsa di sala 760 an de xelkê Xorasan li Edenê bicîh kirin. Mümküne ku ji ber heman sedemê em dibînin zenda Şadiyan ji xanedana Rêwandîya li Qefqasyayê serî hildide. Xemgîn dibêje: Ela Kurd Rêwandî, di dema Emewiyan de ketibû bin desthiladariya wan. Di dema Eba Muslim de gelek alîkarî dan wî ku Emewiyan têk bibe. Di sala 756 an de Rêwandîyan seri hildan. Di rêvebiriya serleşkere Eba Mukanna de

Taberîstan û Rêwandî ji destên Ebbasiyan derxistin. Mukanna ji qebîla Mervê Rêwandî

bû. Ew serhildana ji alî lawê xelîfe Al Mahdî di sala 759 an de bi xwînrijî hate perçikandin. Herdem jî erîşî Kurdistan kir û di şere li hember Rêwandîyan de, 774, serokê êlê mir.(10133) Piştî vê serhildana bi ser neketî jî, êdî Ereb poİîtîka li gorî dilê xwe dimeşînin û Kurdên wir jî beşekî dişînin Anadolê.

Dîrokzanê Kurd Cemal Reşîd Ahmed û hinekên din dibêjin xelîfê Ebbasî û Emewiyan (661-750) gelek êlên Kurd anîn li navbera xwe û Bîzansan de bi cîh kirin. Xelîfê Ebbasiyan yê bi nav û deng Harûn el-Reşîd (786-809) êlên Kurdên bi navê Badilî û Şadı ji Kandahar, Mazenderan, Xorasan û Secsecîstanê anîn û di xeta navbera Canîk (Samsun), Qeyserî û Sîs (Edenê) ê de li hemberî Bîzansan bi cîh kirin. Jİ Badiliyan 125 ber û ji Şadiyan (18 500 xane ne û li F.leşkirtû dijîn, hinek jî li Dersîm û Ezerbeycanê ne) jî 75 êl anîn. Rola wan li peşiya arteşa Tslamê wek mertal bûyin bû. Ew êl û zendên ku tên qal kirin beşek ji kalên Kurdên îro li dervayê welat yan jî ewên ku zimanê xwe şikeştine ne... Niqta ji bo me girîng ewe, ku wê demê ew li Qefqasya û li navenda Xorasanê bûne. Ew demeka dîrokî û girînge. Ya din, ew êdî bi temamı deshiltdariya misil manan pejirandine û teslîmî wan bûne. Bi ser vê de ye, ku ew anîne li Anadolê bi cîh kirine. Lê bal bê kişandin ku tenê êlên di nava zendê Badilî û Şadî de ne. Li Anatoliyê ew belav bûn û ji wan jî federasyonên din derketin. Ew herdu bi qasî 200 élan xuyadikin ku hejmareka pir zêde ye. Lewra îro li Xorasanê nêzîkî 110 êl hene... Paşe bi wasîta wan misilmanan erîşî Anadoliya Navîn kirin. Van Kürdana di bin serokatiya Seyit Bettalê Meletî de êrî§ dibirin ser Bîzansan û heya nava Anadolê çûn. Seyît Betal berê Rafızî, Babatî û Bektaşî bûye. Gor nêrîrta min ew Kurdên hanê piştre wek Germanî tên bi navkirin... Ji bilî wran Kurdên anîne Anadolê, Merwan El Hîmar ji bo seltenata xalanê

xwe, ji Kurdên Kermanşah û Hekariyê beşek, ji bo parastinê li navbera Şam û Libnanê bi cîh kirin. Ji Ebbasiyan dîsa El Mûtasim (835) qebîlên Birohî-Bilocî-Bilohî (Biroxî-Ozkardeş) (Bi dîtina min ev Beravî ne) li Belûcîstanê bi cîh kirin ku erîşbn Selçûqiyan bide sekinandin da ew bixwe li Bexdayê rihet be.(2M) Gor van agahiyan forma bicîhbûna Kurdan jî derdikeve holê. Heta roja îro jî hîn şopa vê bicîh kirinê em dibînin û dijîn. Ji aliyê din ve misilmanan ji şervaniya Kurdan zêde zêde îstîfade kirin û sînorên xwe hreh kirin. Di dema Harûn-ûr Reşîd de sînorên Islamê digihîştin Mavera-ûn Nehîr, Tatarîstan û Hîndîstanê.(13W67) Di sala 1096 an de hêza Ebbasiyan kêm bû. Bi ser vê de, li Iraq û dora Şame tevgera êlên Tatar û Tirkmen li hemberî xiristiyanan tûj bû.(136'17r,) Di wir de nikta girîng ew e, ku di wê demê de Tirkmen li wir hebûne û Tirkmen jî wek ketî bin mêjiyê me ne Tirk in...

Ekrem Cemîl Paşa dibêje: Di sala 750 an de xelîfetiya Emewiyan ji alî Eba Muslimê Xorasanî yê Kurd ve hate rûxandin û li §ûnê xîlafeta Ebbasiyan hat danî. Bi ser vê de li Kurdistanê bê hejmar mirîtî sererast bûn û ew gelek keleh, bûrç û şato saz kirin. Ev mîrîtiyana wiha ne:

1- Erdelan (Kelhor): Pilingan, Derteng, Tahîdest.
2- Siyahmensûr
3- Cengî
4- Zengene
5- Pazûkî
6- Somay
7- Soran
8- Mahmûdî
9- Mukrî

10- Baban
11- Biradost
12- Behdînan
13- Hekarî (Sîno)
14- Mikis
15- Bedlîs
16- Mûş
17- Sipayerd
18- Sason (Herzo)
19- Botan: Azîzan, Gurgîl, Fenîk
20- Hesenkêf
21- Sêrwan: Kufra, Kefrî, Iron
22- Xerzan
23- Farqîn
24- Batman
25- Zirkî: Derdin, Gûrdîkan, Hatax (Lîce), Terdi.
26- Qulp
27- Çepaqçûr
28- Gênc
29- Mirdasî: Egil, Palo, Çêrmûk
30- Sîwerek
31- Çemîşgezek: Mend Kurd, Bêrtek, Sekman
32- Koçhîsar

33- Dûrik

34- Egîn

35- Rişwan(Reşî)

36- Entab

37- Kilîs

38- Sorikan

39- Mendêlan: Mêrdîn, Qesrîk in.

Mîritiyên Kurd bi avakirina van kelehan xwe ji erişen Moxol, Tatar û Tirkan parastin. Le gelekan jî xwe nikarin biparêzin û wenda bûn.(9 I88) Mixabin rehmetî dhê Piraniya ji wan mîrîtiyana diyar nake, dîsa ji bo lêkolîna me girîng in. Ewên ku me reş kirim, Piraniya kalên Kurdên îro li Anadolê, Xorasanê, rojavayê Kurdistanê, rojavayê Sûriyê, Rûsya û dhên din in. Hîna jî Zerikî, Reşî,

Mirdesî yê bi navê xwe li Anadoliya Navîn, Xorasanê û cîhên din kene.

Li jor jİ min qala beşek ji Kurden hatinî kiribû ku xelîfe Mansûr hinek Kurd li Meletî di sala 760 an de bi cîh kiribûn min got ew êlên ku dewleta Germiyan pêk anîne. Di dû wan jî gelek êl û zend anîn. Piştî 60 salan em wana li rojavayê Anadolê dibinin. Birêz Varli dibêje: Dema Xelîfê Ebbasî yê bi navê Memûn (831) de misilmanan bi Roma re şer kirin. Artê§a misilmanan heta Qestemonû û IVlenteşâ (Aydin) çû. Kürden bi navên Xaldî, Germavî û Şadı li dora Kurdîbolî, Kurdî Hîsarî Afyon, Qestemonû û Hamîd Abadê bi cîh bûne.(32>Ji van navana Şadı baş tên zanîn lê yen din ji bo zêde ne zelal in. Germavî ji navê élan zêdetir navê herêmekê ye. Hîna jî li Meletiyê bi wê navê herêmek heye. Ji vir mirov vê yekê derdixe ku êlên ji vê mintiqê hatî, îhtîmaleka pir mezine ku Reşî di nava wan de hene. Xaldî, di dîroka kevn de derbas dibe û min qal kiribû. Eger mirov

konkrettir bike û bibêje ku gelo ew Xelikiyên îro ne, çawa dibe? Dema mirov tevgêra wana dîrokî dide ber çavan ew ne xeyaliye û îhtîmaleka mezine. Bi vî awayî wekî tê îdea kirin: yen cara yekemîn hatine Anatoliyê Tirk in yan jî Selçûqîne (di wata Tirkan de) ne raste. Yên yekemîn hatin rojava û mirîtî avakirine kalên Kurdên îro li dervayî welat in. Varli jî vê yekê piştrast dike: Tİrk dibêjin ew ji Selçûqîne, lê têkiliya wan bi Tirkan re tine; vê demê Tirkek hîn derbasî wî alî nebûbû. Şixa Şîkarî û Munecîmbaşî bi Erebî, vekirî gotiye ev Kurd in.(32) Di beşa Selçûqiyan de jî emê qal bikin, lê di lêkolînê li ser kevirên gorên li Afyonê hate kirin de jî şopa Kurdan îspat dibe. Ji bo vê guman nine ku ew Kurd in.

Kurdên ku wek mertal bikar dihatine di nava hêzen mezin de gelek caran rastî zirarên mezin dihatin û li hember zordariya Ebbasiyan jî di her firsetê de serî radikirin. Di destpêka sedsala IX an de artê§a Bizans dora Firat û Sûriyê kire destê xwe, komkujiyeke mezin pêkanî û berê xwe da Meletî. Li wir di sala 837 an de têk çûn û vekişîn. Lê ji bo ku herêm tampon bû gelek komkujî çêdibûn. Kurdan, di bin serokatiya Cafer Mîr Hesen de, sala 839 an de li hember F.bbasiyên zilimkar serî hildan. Piştî çend şeran Kurd têk çûn. Di sala 890 an de li Colemergê jî serhildan pêkhat û êlên wek: Divioya, Dihivan, Lavatîdyan, Karyan û Barzanî tevlî bûn û Ebbasiyan 500 hezar malbatên Kurd kuştin.(101"79) Torî jî dibêje, di dema Xelîfe Mêhdî de bû. Lê di dema Xelîfe Memnûn û Mûtasim de jî berdewam kir. Begên Tirk di şikil de girêdayî xelîfe, di pratîkê de bi serê xwe diketin tevgerê. Li dijî Bîzansan êrî§ dikirin û taybetî jî ûrîş li ser Antoliya Navîn bûn. Fermandarê Bîzans Jûanis Coûrscoûas di salên 928, 947, 959, 1030 an de rojava yê Kurdistanê û Ezerbeycan hemû kirê bin kontrola xwe û girêdayî bacê kir. Samsat xelandin.<38) Çi dibe bila bibe, di dawiya wan şer û ûrîşan de bi piranî Kurdên di navbera wan hêzan de zirar dîtin. Niqta din ê girîng jî em dibînin ku Imparatoriya Rom Kurdan birine Trakya. Di

derdora salên 1260 an de Roma 10 hezar Kurd birin alî Trakya ku pê êrî§ên Latîniyan (di sala 1204 an de Stenbol heynabûn) ên li ser Stenbolê bibirin. Piştî çûyina Kurdan, Stenbol di sala 1261 an de hate rizgarkirin. Lê çi

bi serê wan Kürdana hat em nizanin.

Di pirtûkên lise yen Tirkan de tê gotin: ku di sîstema Ebbasiyan de wezîrtiyê cîhekî girîng digirt, wezîrê yekemin Yahya B. Halîd el-Bermekî ku bi eslê xwe Iranı ye. Bermekiyan heta sala 830 an wezîrtî kirin.(14R‘I35) Wekî ge- lek caran em tinin ziman di wêjeya Tirkan û nûserên wan de peyva Kurd nine; di cîhê vê de, peyva Irani yan jî Fars bikar tinin. Wekî têyî gotin ew malbateka Kurd e. Di roja îro de wekî Sewêdî derbas dibin ku xas Kurd in û bi nijada xwe gelek serbilind in. Neheqî li vê malbatê-êlê hate kirin û dîroka wan emê di beşa êla Sewêdî de qal bikin.

Di dema Ebbasiyan de alên bikar dihatine jî balkê§ in û pir caran mi¬ser li ser wan dikevin nava şaşîtiyan û xelet tê nivîsîn. C. Paşa dibêje: Nişana xelîfên Ebbasî sancaqên reş bûn. Xelîfe Mûstadî ji bo serkeftina Seleheddîn û Nûreddînê li Misrê ji wan re ew xelatana şandibûn. Ew ji bo şehîdên Kerbelayê bû. Paşê Elewiyan êrî§î ser Ebbasiyan kirin û ji bo ku dijberê wan be alên spî hilkişandin û bi navê Mûbeyyeze navdar bûn. Paşû xelîfe Me'mûn reş rakir û kesk kire şuna alayê û kincan.!136'39) îro jî bandora keskê berdewam e. Lê dema Kurdên li Xorasanê li hember Emewiyan serî rakirin alên sor rakiribûn. Hinek nivîskar vê wek reş didin xuyakirin lê bi dîtina min rengê vê sor e.

Pişti dawî li hatina xelîfetiya Ebbasiyan, Hûlagû Xan Bexdayê jî zept kir û berê xwe da Şehrezor. Elên Kurdên ku li wir dijiyan şand Cizîr, Şam û Misrê, 1257/8.(59) Ihtîmaleke mezine ku evên hatine 3exbiziniyên îro li Anato- liyê, Kurdistan û evên li Haymana ne. Lewra dema min ew lêkolîna

dikir gelek caran çûm gundên Şêxbizina-Lera û hinek gundiyan digot yekemin cîhê ew lê bi war bûne Cizîr e. Heta hinekan digot tapoyê gundên me li wir derdikevine. Bê guman ew ji bo hemû Şêxbizinan derbas nabe, mumkune hinek hatibin Cizîrê û ji wir jî belav bûbin.

SERHILDANÊN XARICIYAN

Di lîteratûra Islamê de komên ku li dervayê sîstema Misilmanên sunnî mane, ewên ku ji sîstemê re sar û dijberiya sîstemê dikirin re digotin Xaricî; yanî kesên li dervayê sîstemê. Bi kurtî muxalifên misilmantiya sunnî ew nava lê dikirin. Mamoste C. Bender dibêje: Ji ber şere Mûavîyê û Imam Eli, neheqî, xizanî, eş û tevlîhevî zêde bû. Piştî şere bi hakem, ku navê xwe Yezîd Asim bû û biryar da ku du alîgirên Elî û Mûavîyê bên kuştin û dawî li şer bê. Piştî wê got: "Hukim tenê yê Xwedê ye" û bi ser vê de bi deh hezaran esker ji Elî veqetîn. Ew di bin vê dûrişmâ de gîhiştin hev. Wana, kesên bawerî bi Elî û Mûavîyê dianîn kafir îlan kirin û bi vî awayî Xaricî derketin holê. Bi ser wê de Elî zayif ket û Mûavîyê jî bi hêz bû; lewra gelek ji wan alîgirên Elî bûn. Pir muhafazakar in, têkçûne qebûl nakin û girêdayî fikra cebrî-şîddetû ne.<123‘74) Gor Faik Bûlût jî wiha ye: Kesên ku ji a^şa Xelîfe Elî û yên li dijî Islama sunnî derdiketine re Xaricî dihate gotin. Wana navê xwe ji cîhê ku li kêleka Firatê yê bi navê

"Hamriye" kom bûn ku li dijî Elî şer bikin girtin. Xaricî, 20 rêxistin in; yên heri mezin Hafssiyê û Harisiyê ne. Ji vvan milana Yezidiyye di bin bandora ramanên Irani de mabûn, şeriata Islamê red dikin û dixwazin ji hole rakin derketin holê. Gelek nivîskar derketina Xariciyan bi şere Elî-Mûavîyê ku li Siffinê derketî û bûyera Hakem, yani salên 657-659 an ve girê dide. Serokê Xariciyan Abdullah bin Vehb el Rasibî ji Elî vê yekê dixwaze: 'Em ji ber xelkê bajar yê zilimkar derin serê çiyayên xwe'. Li dijî Osman li gel Elî bûn, ji ber ku; Elî dostê feqîran xuya dikir, lê paşe hat fêhm kirin ku ev şere desthilatdariyê bûye. Xaricî, gelekî wekhevî hez (şîrîkî) û li hev xwedî

derketinê pêk anîne. Ji gelên bindest re alîkar bûne; kole azad dikirin û xwediyê gotinên xwe bûn. Giringiyê didin wekheviya jin û mêran. Jinên şervan di nava wan de hene. Jina bi navê Şebîbe, serokê Xariciyan Gaxelê yê bi navê Cehîxê Haccacê yê bi zilimkariya xwe tê nasîn têk birin.(40) Xaricî; bi na\ê Ezrakiyye (Ezarika), Sûfriyye, Bayhasiyye, Ibadiyyê dibin çar beş. Li gelek bajarên rojhilatê Kurdistanê û Xorasanê, di sala 690 an de gelek berxwedanên Xariciyan hene. Xaricî dijminê Emewiyan ên sondxwarî bûn.(36) Sedema vê Emewiyan gelek zilim û tadê li misilmanên ne Ereb dikirin; ji ber vê yekê xelkê ne Ereb, nêzîkî koma Ehlibeyt (Mihemmed- Elî) dibû û bi wan re dibû yek. Raman û felsefa wan dipejirandin û ji wan re xizmet dikirin. Ji ber wê, bi taybetî jî li: Iran, Xorasan, Kurdistan alîgirên Elî û îmaman gelek zêde dibûn.(123-58) Yanê ew pişgirî ne ideolojik e, ji bo ku Elî mexdûr e Erebên nijadpereste li desthilatdariyê bû, bi awakî muxalif xuyadikir û vê pozîsyonê pişgiriya Xariciyan digirt. Bi kurtî Xariciyan xwe ji ava kûr davetin ya kêm kûr...

Cîhad û împeryalîzma Ereban di pêvajoya belav bûnê de gelek talan û komkujî kirin. Sîstemeka nû ya bê tolerans û înkarkirina çand û ola kevn ferz dikirî bû. Ji bo wê jî di zilmê de sînor tunebû. Ji bo ku ew şere zilim li ser gelan sivik bibe, bê guman tevgerên dijber jî diketin pêvajoya avabûne. Li ser wê bitêz Ocalan dibêje: Emewî, di dagirkirin û şer de weqas peşta çûn û weqas hovîtî kirin, ku tevgereke li hember vê jî derket holê. Tevgera Xariciyan û 12 îmaman û gelek rêxistinên Batinî bingehê xwe li wê demê hate avêtin.,72) Di dema xelîfe Al Mansûr (754-775) de tevgera Mazdakî bi pê§ket, Xûrremît (nêzîkî Mazdakî ye-Qizil-Aîsora) di serî de li Xorasan, Asya Navîn û Ezerbey- canê gelek aktîf bûn. Sor; sembola ji bo azadî canê xwe fedakirin e.(,V44) Li wan cîhên ku têne qalkirin de Kurd bi piranî dijîn û pê§engên Alsoran jî Kurd in. Ew Kurdên ji ber wê zilme reviyane hemû li wan herêman civîn û tevgerên olî yên nû

derxistin holê. Bi hêzbûna artûşa îslamê û bê sînor bûna wan di dawiyê de ew rêxistinên radikal jî nerm kirin...

Di dema xelîfe Abdulmelîk de, Kurd beşdarî serhildana Abdurrahman bin al-Aşas bûn. Di sala 702 an de Abdurrahman bi Kurdên navê xwe Sabûranê ku li Farsê dijîn re kete nav îttîfaqê. Di sala 735 an de Kurd tevli §erê Emewiyan yê xanedaniyê jî bûn û xwe dan aliyê Merwanê II an û wî jî Abdulmelîk têk bir.(65) Xariciyan, bi enerjiyeka bê tevabûn ji Mûaviyê heta Merwan B. Muhammed

(750) bi xelîfên Emewiyan re şer kirin. Ji navendê gelek derbeyên dijwar jî xwarin, lê li herêmên dur ên mîna Xorasan, Uman, Yemen, Afrika Bakûr tevgera xwe domandin.(105'30)

Serhildanên Xariciyan yen li Xorasan pêk dihatin Emewiyan bi zahmeti têk dibirin. Di sala 776 an debinêvebirê Ebbasiyan yê herêmê Yûsûf bin Ibrâhîm (El Berem) seri hilda. Paşe neviyê xwe Mansûr Ab'bin Yûsûf dom kir. Xelîfe Memun bixwe çû wî şerî û ew têk bir. Di dema Harûn el Reşîd de jî, li Sîstanê ji xelkê wir yekî bi navê Evk Huseyn serî hilda û di sala 793 an de hat kuştin. Paşe ji Xariciyan Hemze bin Etrûk di sala 795 an de serî hilda û ew xelkên bi navê Evk û Cûveynê ku bi alîgiriya Xariciyan dihatin nasîn ji alî misilmanan ve hatin kuştin, gundên wan hatin şewitandin û bi gîştî 30 hezar kes hate kuştin.

Kurdên Mûsilê di sala 866 an de ji serokê Xariciyan Mûsavirê ku Mûsil dagir kiri re hevkarî kirin. Di sala 875 an de jî Kurdan roleka giring di serhildana kolên reşik yên di bin serokatiya Ali Muhammed (Habis) de hatî kirin de lîstin. Di sala 906 an de Kurdên Hazbanî erîşî Mûsilê kirin, her der xirab kirin û waliyê Mûsil têk birin. Xelîfe artöş şand û ketin şopa wan; wana jî berê xwe dan Ezerbeycanê. Ew Kurdên ji vir çûnbûn paşê dewleta bi nav û deng a Şadî ava dikin. Şadî zendekê pir şervan û mezin e. Di bin sîwana vê devletê de, bi qasî min tespît kiri sê kon/federasyonên êlên

Kurdan hene. Vana Şadî, Reşî û Badilî ne. Dewleta Şadî bi Vîkîngan re jî gelek caran şer kirine. Ji bo wê, beşa piştî wê ya bi navê têkiliya Vîkîng û Kurd de, emê li ser rawestin.

Di dema Xelîfe Mûktedir (942) de jî, Kurdan aliyê Mûsil rûxandin; lê ji alî waliyê bi navê Hamdanî ve hatin ceza kirin. Kurdên Celalî ji hemûyan pirtir li ber xwe dan.<51> Celalî, şerva^n Kurdên koçber in; ew ji şer qet paşve gav navêtin û heta dawî ol, çand û nasnama xwe parastin û stû li hember Ereban xwar nekirin. Ew Celaliyên ku navê xwe derbas dibin, di bingeh de navê Kurdên Şadî, Reşî, Badilî û yên din ê giştî ye...

TÊKILIYA KURD Û VÎKÎNGAN

Wek tê zanîn ji kalên gelên Danmarkî, Swêdî, Norweçî û Islandî re Vîkîng tê gotin. Tê gotin ku gelé cara yekemîn Amerika keşif kirî jî ew in. Hi- nek çavkanî dibêjin dora salên 800 PI serdema wan destpê dike, lê gelek belge berî vê demê destnîşan dikin. Dema wan ê heri bi hêz dora salên 800 an bê gotin rastir e. Vîkîng, hê ku ji hev veneqetîbûn li Skandînavya, bi taybetî jî li başûre Swêdê û li Danmarkê kom bûbûn. Ji ber sedema li bakûrê welatên wan hê jî şertûn jiyanê kêm bûn, xelkê Vîkîng jî debara xwe bi masî girtinê û talana welatên din dikirin û li başûre Swêdê kêm çandinî jî hebûye.

Di navbera kalên beşekî Kurdan û Vîkîngan de jî tekilî û şeren ba^ş qewimîne. Tê bîra kê ku ji Skandînavya heta bakûrê Kurdistanê Vîkîng herin û bi Kurdan re şer bikin? Gelek kes vê yekê bawer jî nakin! Mirov dikare maf

1 Fill Bysart*

Yan jî, gereg bigotana Welatê Saka! Lewra ji bakûrê henême re Sakaîstan dihate gotin û kalên Kürden li dervayî welat ew herêm demeka dirêj wek

ware xwe bi kar anîn. Ji bo vê yekê jî îspat wiha derdikeve holê. G. Larsson ji pirtûka Ibn Khordadbeha ya di sala 840 an ya bi navê "Kîtab al Masalik Wa 'L-Mamalik'-The Book of roads and Kingdoms" hatî nivîsîn de van agahiyan dide: Gelekî bi eslê xwe ji As-Saqalîba, ji quncikên Welatê Saqalîba yê dûr, poste heywanan, yen roviyên reş û şûr tanîn derya Rûm (gereg derya Reş be-Ş)... Vîkîng ji quncikê Saqalîba dihatin derya Reş û pa§ê bi peyatî diçûn çemê Don û di nava dewleta Xezeran de jî diketin nava derya Kesk...<196'205) Ji vê berhemê jî vekirî derdikeve holê ku navê vî welatî As-Saka ye. Vî navî jî em ji nivîskaiên Swêd; Aron Andersson û Ann Sand wall fêr dibin ku ew welatê Alanan e. Yanê Kurdên dimilî.(153) Yanî Vîkîngên ji Welatê Saka/Kurdan derbas dibûne û dihatine derya Reş û Kesk. Nivîskarên Swêdî ew nava zêde dernexistin peş, di cîhê wî de li ser Şerqland disekinin.

Gor Alakom ji T.J. Arne radigihîne, ew navê Şerqû yê ji bajarê Sarkel ê li bakûrê Derya Kesk girtibûn. Vîkîngan ji dora derya Kesk gişţikan re digotin Şerqland.(74'23> Ez ne di vê dîtine de me ku navê Şerqe ji bajarê Sarkel hatibe û bajarê li rojavayê derya Keşke. Sarkel jî navekî kurdî ye û mirov dikare di gelek cûran de şirove bike. Ya herî baş bi dîtina min ê di wata 'ser ê-kel' de ye. Bi taybetî xelkê li vir jiyayî pir pez xwedî dikir û ew peyva bi piranî ji bo ajalên bi siro/şax û cîhên bilind bi kar tê. Dibe ku bajar li cîhekî bilind hatibe avakirin û ew nava lê kiribin. Ti têkiliya Şerkland bi Sarkel ve nîne. Herêm jî BI di destê Kurdên-Saka de bû, ew nav jî kurdî ye. Lê dema Vîkîng hatin herêmê rewşa demografik cüda bû.

Vîkîng çawa dihatin? Vîkîngên ji çar welatan, li başûre rojhilatî Swêd digihîştin hev; ji wir jî bi riya çemên Dînyeper, Don û Volga dihatin derya Reş û derya Kesk. Dema dihatin derya Reş, kralê Rûm ji wan bac nedigirt û eğer wana bixwesta dikaribûn herin itil (Atil), ew li ser çemê As-Saqalîba û di nava bajarê Xezeran Khazars de ye. Li wir serokê wan bac distand.

Paşâ ew diçûn derya Kesk û dora Gûrjan(Cûrcan) û keviyên wir. Carna wana tiştan bixwe re dianîn, ji Gûrjan bi hê§tiran dibirin Bexdayê.(,96 205) Ji wan jêderana em niqteyeka din fêr dibin, ku navê çemê Volga yê bere As-Saqalîba ye... Ew jî îşareta vê ye ku Kurd li herêmê demekê direj jiyanê.

Nivîskarê Ereb Ibn Rusteh di sala 903-913 an de wiha dinivîse: Kralekî wan ê Rûs bi navê Khakan...hebû. Ew ji bo talankirina Saqalîba êrîş dikirin; bi keştiyan dihatin, ew dîl digirtin, bi xwe re dibirin welatê Xezer û Bûlxar û bi wan kirîn û firotinê dikirin... Wana li beşên welat nedikarin bimînin, tenê tiştên bikaribin bi xwe re bibin ji Saqalîba dibirin. Sîstêma wan tenê tişt/alav bihev guhartin bû, posté sîmorekê û postên ajalên din bû. Ji bo wan jî zêr û zîv digirtin.. ,<196~205) Di rûpelê 206 an ya heman pirtûkê de, Saqalîba di nava kevanê de weke Slav tê nivîsîn. Ew îşareta vê ye, ku welatê Saka-Kurd ji alî Slavan ve hatiye dagirkirin lê hê jî bi navê kevn (Saka) tê bilêvkirin. Yan jî, ji ber nezaniya

nivîskaran Kurdên li wire nedîtine. Di vê serdemê de ji bakûr Rûs, ji rojava Bîzans û ji başûr jî eriş û firehbûna Ereban hebû.

ew / ^ j~7

Rêyên Vîkîngan û Dewleta ŞADÎ

Di pêvajoya ku misilmanan dest bi firehbûna sînorên xwe kiri de, gelek caran erîşî dora Mûsil kirin. Ji sala 640 an bigre beta 950 an ârîşen servegirtina Ereb-misilmanan berdewam kirin. Kurdên li vê mintiqê ketin tengasiyê jî, berê xwe dan Arran/Ezerbeycan. Ji van jî yen heri bi navûdeng konfederasyona Şadî bûn. Le pêwîste neyê ji bîr kirin, ku Arran heri kêm ji Xorriyan vir ve welatê Kurdan e. Serokê Şadiyan, Daysam îbn îbrahîm al-Kurdî bû. Dibêjin

ku bavé wî Xaricî bû ye û hevalê serok Harûn aş-Şarî yê ku me qal kir e. Di vê de ti guman nine ku Kurd bi piranî di nava Xariciyan de bûn; ji ber ku evv muxalifên Islamê yên heri mezin bûn. Firehbûna axa misilmanan tevgera Kurdan ya bi sed salan têk biribû û vekişîn herêmên çiyayî. Şari, di sala 986 an de li Mûsilê hat kuştin bi şûnve, bavé Daysam reviya Ezerbeycanê û li wir bi keçikeka serok êlekê re zevicibü.(3-62) Malbata wî ji Mûsil bû; dema li Mûsil nakokî derketin, 896/97, malbata wî hat Ezerbeycan. Li wir bi keçikeka serokekî Kurd re zewicî û Daysam hat dinê. Çend caran xwest Ezerbeycan bi giştî têke bin kontrola xwe, Piraniya eskerên wî Kurd bûn û di sala 952/53 an de mir/74'30’ Di vê dîtinê de nakokiyekê xuya dike. Lewra di berî wê demê de, dewleta Şadî hatibû avakirin. Gelo Daysam û Şadî ne ji komekê bûn? Dîsa xuyaye ku serok Daysam xwe davê paş êlên li Qefqas û bi keçikeka serok êlekî re dizewice. Gor fikra Polatyan: Daysam bi Kurdên koçberên li wir re jî şer kir.o-M) pw şera jî divê ji bo berjewendî û seltanatê be. Di sala 950 an de Ardebîl wergirt û bi navê xwe pere derxist.(366) Di sala 953 an de bi hinek Kurdan ve direve Bexda ye. Bi alîkariya serokekî Kurd ê li Ezerbeycanê dikeve bajarê Salmasê. Ibn Mikravayh dinivîse ku; di sala 944 an de Rûsan êrî§î Berda kirin û heta Urmiyê çûn. Marzban 13.000 esker komkir û Rûs derxistin/3'68*

Wek tê zanîn dewleta Şadî di sala 951 an de, ji alî Mûhammed Bin Kartû yê girêdayî êla Rewadî, li bajarê Anî yê hate avakirin. Dosta birêz arkeolog Gunîlla Larsson got; Cara yekemin Vîkîng bi Kurdan re dora sala 700 an hatin hember hev. Vê demê Vîkîng ji başûre Derya Kesk yan jî ji Gîlanê derbasî Bexdayê bûn. Dema bi keştiyen xwe hatin keviyên Gîlanê rastî Kurdan hatin. Gori texmînê jêderên Swêdiyan cara duyemîn Kurd û Vîkîng di sala 943 an de, dema wan êrîşî bajarê Berda (başûri? rojavayê Baku) kirin hatin ber hev. Ew bajarê kirin û firotinê yê li Arranê ye, ku ji bo

Vîkîngan pir giringbû. Bajar li nêzîkî çemê Terter e, ku berê jêre digotin Ava Kurd-Elem.(74'25) Îhtîmale ku navê vî çemê din jî ava-Saqalîba

be. Ji dîrok nivîsê Ereb Mukaddasî jî wiha radigînin: Li wir Kurd rûdinên; ji vê herêmê re "Deriye Kurdan" jî tê gotin û mintiqeka pir dewlemende.(74'25)]i wê lêkolîna birêz Alakom û lêkolînên nivîskarên Swêdî kirî de ev derdikeve hole, ku berî Şadî bi dewlet bin jî Kurd li vê herêmê nişteciîh in. Ji vê yekê ti gumana min tune, lê başe ku gor lêkolînên Swêdiyan jî ew hatiye pejirandin. Wekî din jî eğer mİrov bala xvve bide ser erdnîgariya Qefqasya, navên deveran bi piranî kurdî ne ku ew jî îspatek e.

C. J. Bosworth di Ansîklopediya îslamê de wiha dinivîsîne: Mîrnîşînеka Kurdan peşketî ya Şadî yê li Arran heye. Pay texte wê Cenca ye û dîroka xwe diçe sala 859 an dibîne. Yek ji kese damezirandî Muhammed Şaddad bîn Kartû ye û ew ji êla Rewadî ye. Seleheddînê Kurd ê mezin jî ji vê êlê bû. Gor Mînorskî kalê Seleheddîn li gundekî nêzî bajarê Dvîn (Dabîl) hatiye jiyanê. Ew malbata ji sala 952 an heta 1174 an li ser text bû. Gelek Kurd li wir hene. Nivîskarê Ereb îbn-al-Athîr dibêje, di navbera salên 600 û 1000 an de 10.000 Kurd ji alî Xezeran ve batin kuştin, ku ew li navbera Volga û Kafqasan dijîn. Xezeran bac digirtin û ji Vîkîngan jî ji sedî deh distendin.(74'26) Li jor jî min hinek qal kir ku kalên Xezeran îro li Afganistan jî, gelek caran erîşî Arran kirine û bi Kurdan re şer kirine. Ji bo vê Kurdên wêderê ji alîkî bi brîşen Vîkîngan ji alîkî bi yen Xezeran û ji alîkî din ve jî bi yen Gurciyan gelek zirar dîtin.

Em ji birêz Alakom fêr dibin: ku bi hezaran Vîkîngan di sala 943 an de erîşî ser bajarê Berda kirine. Xelkê bajêr dîl hatiye girtin. Marzûban îbn Muhammed ku bajar diparast bi hezaran mirov komkirin li dijî Vîkîngan derket. Lê Vîkîng di şer de bi serketin, di heman deme de bi nexweşiya epidemiye ketin ku hejmara wan roj bi roj kêm dibû. Vîkîngan gelek zêr,

zîv û tiştbn hêja birin. Jin revandin û paşe li bakûr, li bazarên koleyan ew firotin. Gor îbn Miskawaîh, li Berda kesên bê hesp hemû hatin kuştin. Perên Kurdan yê ku navê "Daysam îbn Îbrahîm al-Kurdî-936/937" li ser nivîsî, ji Arranê hatin girtin û di sala 1929 an de li girava Swêdê bi navê Gotland hatin dîtin.(74'29) Hîna jî ew derdikevin û tê gotin ku di muzeyên Swêd de, di navbera 2000-3000 perên zîv ên Kurdan hene.

Sed sal piştî talana li Berda, Vîkîng, di navbera salên 1030-1033 û 1041 an de dîsa çûn ser Berda; hinek Vîkîngan li cem mîrê Derbend di 987 an de kar kirin. Lê êrîşa di sala 1041 an de ji bo Vîkîngan bi felekatê encam bû. Piraniya Swêdiyan mirin.(74'30) Mirina wan jî bi mey we bûye. Dema hatin Arran li daran gelek meywe hebûye, vvana jî gelek xwarine, mümküne beta wê demê mey we jî nexwaribin yan jî meywe bi jêhr bûn ku pê mirin.

XORASAN WELATÊ KÊ YE?

Heta vir min gelek caran qala Xorasan û Eba Muslimê Xorasanî kir. Lê Xorasan kudere, welatê kê ye, rastiya xwe çi ye, çiqas Kurd li vir dijîn û

tekoşîna qehremanê Kurd Eba Muslimê Xorasanî di kijan atmosfere de pêk hat? Emê hewl bidin ku li bersiva wan bigerin.

Li gor nexşa dünya ya îro: Xorasan li rojhilatê bakûrê Iranê-bakûrê Deşta Kevir, di navbera derya Kesk, Tirkmenîstan û Afganîstanê de ye. Berî misilmantiyê, Ereban ji beşekî Afganistan û Tirkmenîstanê re jî digotin Xorasan. Misilmanên yekemin ji cîhên ku li dervayê rojavayê Iranê re digotin Xorasan. Erdnîgariya Xorasan gelek çiyayî ye. Çiyayên bilind yen heta 2000-3000 metre ji alî Afganistan û Tirkmenîstanê ve li Xorasan digihîjin hev û berbi başûre derya Kesk dirêj dibin. Ji bo vè coğrafya çiyayî û bilind, di dirêjahiya dîrokê de ew herêm hertim bûye parêzgeha Kurdan. Başûre Xorsanê jî deşte.

Xorasan

Beri her tiştî pêwîste em li ser pey va Xorasan rawestin. Dîroknûsê Kurd M. Emîn Zekî dibêje: "Hor" di zaravê Soranî û Dimilî de tê wateya rojê.09' 154) Navê Xorasan jî tê wata cîhê rojê. Kek Alî dibêje: Xur= roj e û San=Tîr û ronahiya rojê ye.(36) Gor Haşîm Kûtlû jî: -san: laş/mekan e, canê ku cîh dîtiye.022' 62) Rişvanoglû jî dibêje: Afganistan û Pakistan jî di nav de, bi farisî tê wata welatê rojhilat. Di serdema yekem û ya navîn de Tirkên Saka li wir bi cîh bûn û bi ser vê de ji wê re gotin Sakaîstan/Sexîstsan û di dema Islamê de jî ew bû Seîstan.(,28'23) Wekî me li jor jî göte, Saka Kurdên îro li dervayê welat in. Andrew Collîns jî şiroveka din dike: Li Qehîrê heykelekî mezin heye, ku li rojhilat mêzedike û bi roja 21 Adarê ve eleqa wî heye. Gelek nasname û erkên wî heykelê mîna §êran hebûn. Ji wan ya yekemin û ya herî girîng ew e: ku

şekle Xwedayê rojê Horûs Hor-em-akhet ve digihîştin hev. Di asoyê (horizon) de Horûs û Hor-akhty yanê: gihîştina hev ya Horûs û Horizon bû. Di vê dema mitolojik de rola Horûson dilîste, di bingeh de rola dane Xwedayê rojê Rê ye (159-3%) Agirê mezin Hvar, yanî roj... mîtolojiya Aryan e(7, 35)dibêje Bilgin, di vê peyvê de jî derdikeve holê ku Hvar-Xar-Xor tê wata rojê.(7I‘35) Heta peyva H/Xorîzon û Xor jî gereg ji heman kokî û wateyî derketibe.

Di beşen derbas bûyî de jî, car bi car me qala Xorasanê kir, bi taybetî jî êlên Gûtî û Xorrî ji Xorasan heta Anatoliya Navîn û Derya Spî belav dibûn. Elên Xorrî li dora Alallah-Surî li ser keviran jî nivîsîbûn. Ji bo dîroka Kurdan Xorasan cîhekî girînge; lewra gelek dîrokzan û lêkolîner dibêjin ku Kurd ji rojhilat, yanê ji dora Hindistan û Asya Navîn hatine, îhtîmaleke pir mezine ku kalên Kurdan Sumerî jî ji wê herêmê hatibûn. Lê heta vir min jî hewl da ku işaret bikini ku Kurd ji başûr, ji hîva bi heyî berbi jor û berbi rojhilat

mecbûr man ku hilkişin. Gor dijminan, hêza wan Kurdan ji cîh guhartinê tê û ew li bakûnê Derya Reş jî mane. Wekî me berê jî göte: Çanda ji Loristanê heta Xorasan û derya Kesk û Derya Spî wek hev e. Vê yekê gelek lêkolîner dipejirînin û alavên ji kolanên li vê herêmê derketine jî vê dîtine bi hêztir dikin. B. Amedî dinivîse ku: Belgên li başûre Derya Kesk, li girê Hîsar û girê Tûragê derketine, belgeyên ji 2000 sal BI mane û ew aîdê kalên Medan e. Derket holê ku Med li vê herêmê bi cîh bûne.(59) Bi taybetî xeta bakûr, yanê ji Qefqasya bigre heta Xorasanê û Afganîstanê Kurd li herêmên çiyayî gelek mane ku sedema vê jî êrî§ên hêzên mezin in.

Yekemîn Imparatoriya ku li ser erdê Arranê avabûye ya Medan bû, ku ew kalên Kurda ne. Vê demê jî û pişti Medan di serdema Farisan de jî Xorasan di destê Kurd û Arraniyan de bû. Wekî pismamê min ê hêja Tewahûddî dibêje: Berê Med, niha jî Kurdên Madano li Xorasan wîlayeta Mazenderan hene. Her wiha Kurdên Kêywan-lo û Kawî/Kawyonî jî hene ku yen dora padîşahiya Kiya nin. Kurd di çend pêvajoyan de hatin Xorasan. Berî Islamê jî Kurd li wir mabûn û li herêmê pir bûn. Ji ber ku heta bi siltan Mesûdê Xeznewî re çûne serê Semerkant, çûne Hindîstanê. Piştre dîsa leşkete Kurdan, bi siltan Mesûd û Tûxrûl Begê Selçûqî re di herêma Qoçanê, Nawîqê û herêmên din yen derdora Qoçanê de şer kirine. Erdê wan ê eslî derdora rêze çiyayên Zagros û heya çiyayê Demewendê bûye. Bajarê Rêy navekî kurmancî ye û te wata rê. Di Avestayê de Rêga hatiye nivîsandin.(l43'10) Wekî pismamê min jî dibêje Kurd berê jî li vê herêmê hebûn. Di gerên min ên salên 2001 û 2003 an de gelek kalên Xorasanî yên kurmancî axêf: "Em pêne hezar sal in li vir dijîn. Kalên me berê li wir bûne " digotin û li ser çiyayên asê, cîhên ku kalên wan li ser jiyayî nîşanû min didan. Wekî tê zanîn li Anatoliya Navîn jî êleka girêdayî Reşiyan bi navê Molikiyê heye. Di vê babetê de birêz

Bûlût îddeayeka baü«?ş tîne holê, gor wî: Kurdên berê li Xorasanê dijîn bi yên îro ve ne yek in. Evên îro li wir dijîn di sedsala XVI an de koçber kirin.(36) Ew li ser kijan bingehê vê yekê dibêje nizanim. Lê texmîn dikim ew dixwaze bibêjê; ku Kurdên berê ji

wir hatin Kurdistanê. Di sedsala XVI an de ewên nû ji wir hatin ajotin. Lê di kûrahiya dîrokê de kalên van Kurdên îro li wir li Xorasan dijîn. Wekî me di beşa Saka de jî qal kire, Saka kalên Kurdên îro li dervayê welat in. Berî sedsala

XVI an jî li wir Saka hebûn. Wek Seferoglû ji Teberi (sala 915) radigihîne: Di sala 591 an PI de li Xorasanê, Saka yên li wir ji milê "Arsak" ên ji birayê Deryam Çopîn re, ji ber navê êla wî, ji wî re digotin Kurdî; ji xwenga wî re jî digotin Kürdiye/91'91 Kurdan car carna cîhên xwe li Xorasanê guhartine lê heta hatina Tirkan ti caran ewder terk nekirin. Bi hatina Tirkan re, 1030/40, mirov dikare bêje ku bi piranî wê demê Xorasan hate terk kirin. Wek W. Ivanov jî dinivîse hê jî koloniyên Kurdan mane: Di sala 1245-1389 an de li başûre Heratê yê di çiyê de xanedaneke bi navê "Kurd" dijî.

Li jor Tewahûddî qala navê bajarê Rê (Tehran) kir. Ew nava ji rê ya kurdî tê. Lê kalên me çima gotine rê? Ew riya kuderê bû ? Belê, ji bo ku navê rê lê danîne, tê wê watê ku ew li ser riya wan bûye. Gelo ew di navbera Kurdistan û Xorasan de bû ji bo wê gotin? An jî, ew li ser riya cîhekî, kesekî pîroz bû ji bo vê gotin? Herdû bihev re jî dikarin bibin; lê baweriya min li ser ol û pêxember e. Li ser wê em guh bidin Bilgîn: Şirova bi giştî Xwanîratha welatê Aryana ye... Zerdeşt Pêxember bajarê Belh ji xwe re kiribû navenda perwerdê. Di serdema Imparatoriya Med de, Xorasan welatê Medan bû û olperestên Zerdeştî (Magî) wêder heta salên 900 an PI kiribûn bin kontrola xwe. Bajarê Merv jî navenda serhildana Eba Muslimê Xorasanî bû. Li dijî Emewî û Ebbasiyan keleha berxwedane bû. Li bakûrê Xorasan serhejmara Kurdan di piraniye de bû û di dema

Selçûqiyan de wek "Kurdistan" derbas dibû. Paytexta Xorasan bajarê Tûs (Meşhed) e. Bajar, di dema entîk de ji alî malbata Nodarya/Notarya ve hatiye ava kirin. Ev malbata Viştaspa ji mintiqa Medya yê bi navê Notarya hatibû wir. Ji Aryanên ku ewdera ji xwe re kirine war re digotin "Mazanan".(71) Gelek dîroknûs Xorasan wek Kurdistan bi nav dikin; ew xeser nebûye, bê guman ji berê ev li wir bûna Kurdan û pirbûna wan ew encama derxistiye. Birêz Izady jî vê yekê dipejirîne û niqteyeka din ê balkê§ îşaret dike: Dîroknivîsan di sedsala

XVII û XVIII an de tenê ji wir re gotine "Kurdistan". Eger li bakûr ew şer û xiravekirin pêk nehatana, îro îhtîmaleke Kurd bi gîştî wek Kurdên Xorasan renga reng bûyana.(l54'39) Mebesta birêz ew e, ku Kurd di serdema kevn de wek Kurdên Xorasanê bi rengê sor xemilîbûn... Ihtîmaleke mezine ku ew dîtin raste, lewra Kurdên Xorasanê pir hindik heliyane û çandên din pir kêm ketine nava wan; wek orîjînê xwe mane.

Li ser paytextê bi navê Tûs Ekrem Cemîl Paşa wiha dinivîse: Key Tos (wek Diyako tê zanîn) di sala 715 an BI de li ser textê Medan rûnişt û 60 salî ew kara berdewam kir. Di van deman de firehiya Kurdistanê ji sînorê Hindîstanê digihîşt heya Derya Reş; ji Derya Kesk heya keraxên derya Ummanê. Key Tos, bajarê Tos/Tûsê îro li Xorasanê ava kir.(9'72) Bajarekî taybet e, gelek jî kevne û xerab bûye. Dema min ziyaret kir dewleta Iranê tamîr dikir, ketina navê qedexe bû. Bajar bi kerpîçan hatibû çêkirin, xuyaye çend tebaqe ne û di bin re

jî rêyek veşartî heye. Bajar ji derve bi çend sûran hatiye pêçan. Sûr yekê nêzik e û yek jî dûr û pir fire he; ya sêyemîn jî çavê mirov nabînin û ji dûrbûn xuya nake. Dora bajêr bi avê jî dorpêç kirine ku ma ji alî ewlekariyê ve baş be. Kurê Key Tos, Key Ferîbrez jî di sala 600 an BI de bû serokê Medan û sînorên Medan heta Ceyhûnê; li rojava jî heta Toros û

Lîdyayê fireh kir.(9'75) Bajarê Tus di dema Tîmûr de bi erdê re hate kavil kirin û şewitandin.(36)

Bajarê Tûs

Xorasan piştî Medan di serdema Persan de jî di destê Kurdan de bû. Bûyera wê demê ya herî girîng ji alî Herodot ve hatiye nivîsîn: Kralê mezin (Da reios-BI-521-486), li ber pêne geliyan hewzên bi qapaq çêkirin û peşiya avê girt. Deşt tijî av bû. Welatên din ji avê mehrûm man. Paşe, pere ji welatên cîran distend û av dida wan.(S4) Dema ez çûm Xorasan şopen vê bûyerê bala min kişand: li çiyayê bilind en ji hezar metreyi ne kêmtir, heta jor şopa avê hebû. Mirov matmayî dimîne ku ew av çawa girtine; wek avbendên îro ew çiyana di bin avê de hîştine.

Xorasan, ne wek her nûserekî Tirk îddea dike welatê Tirk an e û her kesê ku ji vê herêmê hatî jî Tirk e! Xorasan welatê Arranan e. Di vê peyva Arran de mebesta min Kurd-Saka, Faris, Tacik in. Gelek caran Tirkan erîş kiriye û dagir jî kiriye, lê nebiye welatê wan. Seferoglû yê ku yek ji Ideologen dîroka Tirk e û bi heman mentalité nêzîkî dîrokê dibe û dixwaze Xorasan wek warê Tirkan nîşan bide. Lê her ku dilive di nav rastiyê de dixeniqe, dibêje; Di sedsala VII an de li Xorasan, heiêma Kûhîstan, Xalaç bi Kurdan ve nîv-koçer tevhev dijîn 0 debara xwe bi pez û heştiran di kirin.(9,'10) Di vir de vekirî dipejirîne ku Kurd li vê herêmê hebûne. Başe ku bê zanîn, ji Maveraûnnehîr re berê digotin Kûhîstan.(187'455) Hîna jî li rojhilatê Bûhara gundekî bi navê Kend-î Kurdî heye. Di dema Tîmûr de li nêzîkî çemê Heratê li zozana Oleng-Neşîn kişlaxka bi navê Kurd-Neşîn (Konaxa Kurd) heye.(9M0/11> Belê, em spasiya wî dikin ku agahiyên giranbiha ji me re nivîsîne ku Kurd li wir jiyane û navê xwe dane

cîh û waran. Dîsa gor "Secere-î Terakîme" li keviya rûbarê Seyhun mintiqeka bi navê Kurdîşe heye û berê ji kesên li wir dijî re jî digotin "Kurdan".(9l'25) Mînorskî xelekeka girîng lê zêde dike: Navê êla Kelhûr Goran e. Kelhûran sê milên xwe hene: Pilingan, Derteng û Mahîdeşt. Darna û Dertengan erdê xwe li Hûlwanê bû. Mahîdeşt koçber bûn.(2109) Wek gelek jêder didin xuyakirin, Kurdên li Hûlwanê di dema erîşen Ereban de hatine vê herêma Kûhîstanê û ji vir jî berbi bakûr û rojava çûne.

Doç. Yilmazçelîk jî, ramanê me heta vê derê dipejirîne û wiha dinivîsî- ne: Belge îspat dikin ku êla Okçû Îzzeddîn di salên 200 an PÎ de li Asya Navîn jiya ye.(116'64) Berê jî me got, ku Saka kalên Kurdên îro li dervayê welat in û êlên di bin sîwana wan de yek jî Okçû ne. Di esas de ewe girêdayî Badilî-Şadiyane. Yanê: Reşî, Etma, Şadî, Badilî, Milan, Êlên Dimilî û yên din wê demê li Xorasan û derdora wir bûn.

Me di beşûn derbas bûyî de jî gotibû; ku dema Sasaniyan bakûrê rojavayê Kurdistan kirin bin destên xwe, Kurdên li wir bi piranî şandibûn Kûhîstanê. Di destpêka sedsala VT an de, ji bo ku Hûn ên ji bakûr ve ketine welatê wan rawestînin, êla Kurdên Gor, ku li çiyayên Elbrûzê li başûıe Hezar dijiya bi piranî li Xorasan û bakûrê Xorasan bi cîh kirin.(4199) Bi vî awayî em fêr dibin ku di dema Sasaniyan de jî gelek êlên Kurd ji bakûrê Kurdistanê û ji dora Gîlanê hatine şandinî navenda Xorasan. Yên li bakûr Kurmanc in û yên li Gîlanê jî îhtîmaleka mezine ku Hewreman/Goran in. Hîna jî Kurd li vê herêmê hene û min beşek ji wan ziyaret kiribû. Li herêmê niha: Dimilî-Goran, Lek û Kurmancî axêf hene. Li ser vê babetê birêz Xemgîn Kurdên ji Farqînê dest nîşan dike: Di sedsala VI an de, Deryayêmê V an yê Sasanî Kurd ji Farqînê û êla Gor a li başûre Derya Kesk bire Xorasan. Li wir jî, vana di sala 1148-1215 an de dewleta Gor avakirin. Ew pesna xwebi hilweşandina seltanata Dehaq didin. Dewleta Gor, bi Selçûqiyan re hate girêdan.(101'53) Wek tê zanîn li navenda Anatolî ye li

dora bajarê Aksarayê Kurdên Kirmanckî axêf, li Haymanê jî Kurdên Lorî/Şûxbizinî axêf hene. Li dora wan jî Kurmanc hene; dema mirov vê tevlîheviyê dibîne ew koçberiyên bi zorê li jor me gotine tenê bîra mirov. Yanê ew Kurdên bi zorê ji rojhilat re, yan jî navenda Xorasanê re hatine şandin ku piştî demeke dirêj dîsa hatine navenda Anadolê û ew kompozisyona derketiye holê. Lê dema çûne navenda Xorsanê jî rihetî û aramiyê nedîtine.

Xorasan, di dema Islamê de xwîn û agirê herî zêde dît. Dema misilmanan dest bi sînor fireh kirinê kirin û ola Islamê bi zorê bi gel dan qebûl kirin, Xorasan kete nav agir, xwîn, şer û têkoşînê. Hinek dîrokzan dibêjin Xorasan cara yekemîn di dema xelîfe Orner de, hinek jî dibêjin di dema xelîfe Osman de hatiye dagir kirin. Mirov dikare bêje dema vê salên 651/652 an bûn. Mumkune ku di dema Orner de ûrîş hatibin kirin lê tam dagirkirin di dema Osman de be. Hemû dijberên Islamê li Xorasan gihîştibûn hev û piştî zordariyên misilmanan serhildanên Xariciyan jî destpê kiribûn. Serhildana yekemîn di dema îmam Elî de derket. Waliyê vê demê Ca'de bû û artûşa Ereban di bin

rêberiya Xalîd bin Kurra de aramiyê ava dike. Di dema Mûaviye (661-62) de jî serhildan çêdibe û artöşa Ereb di bin serokatiya Abdurrahman bin Semure da çû Sîstanê. Ferman da rê herî zalim jî, Kuteybe bin Muslim bû û di salên 705-715 an de gelé Xorasan û Maveraûnnehir (Buhara, Semerqent, Beykent) hi agir û xwînê ve birêve dibir. Ji serhildanên sedsala dom kirî, ên herî girîng serhildanên Xariciyan in. Ji binemala Ebbasiyan Muhammed bin Eli li nêzîkî Şame li mintiqa el Humeyne rûdinişt û li dijî Emewiyan bi veşartî xwe bi tevger dikir. Xorasan, vê demê cîhe berxwedanê ye. M. Bin Alî 12 mirovên xwe yen baş bi Eba Muslim ve şandin Xorasan. Eba, li wir xelk bi tevger kir û li hember rêjîma Emewiyan derxiste tevgerê. Di şere hatî kirin de Emewî têk çûn û Ebbasî

hatin cîhê wan. Xelîfe bi nemerdî Eba kir kemînê û ew kuşt. Bi ser vê de gelên Xorasan bi dehan salan di serhildanê de bûn. Emê di beşa Eba de bi firehî qal bikin.

Gundê Mirîşkan - Xorasan

Ebu'l Ferec dibêje, di sala 967 an de ji Xorasanê çend kes hatin Antaqya û bi sê hezar Erebî ve ketin tevgerê ku Kapadokya dagir bikin. Li hember vana 40 hezar leşkeren Rome şer kirin û paşe di nava wan de nakokî derketin. Di vir de ev pirsa dikeve serê mirovan, gelo çima Xorasan û Antaqya? Têkiliyên wan çi bû? Bi dîtina min ev têkiliyana li ser esasê êlî bûn. Yan konfederasyon- êleka parçe bûyî yan jî êlê endamên federasyonekî li wan herdû herêman dijîn û alîkariya hev dikirin. Lewra êlên vê demê li bakûr û bakûrê rojavayê Sûriyê dijîn, bi koka xwe ji Xorasanê bûn. Ew êlên ku bi Ebbasiyan re şer kirin û têk çûn li vê herêmê belav bûbûn. Ji malbata Dirêjan pîremêrekî wiha dibêje: Di sala 748 an de, ji alî Eba Muslimê Xorasanî 24 êlên Kurd ji Xorasan ji bo Kerkük, Hewlêr û rojava tên şandin. Eba bi hêza wan Emewî gerkirin û şuna wan Ebbasî anîn. Di sala 754 an de jî Eba ji alî Ebû Cafer Mansûrî ve tê kuştin. Bi ser vê de 24 êl, ji bo ku heyfa wî heynin diçin ser Ebbasiyan; sê mehan şer dikin lê têk terin û vedigerin Elelep, Riha û Meletî yê. Heta sala 1164 an li vê herêmê û li destên Hama, Hamik û Mereşâ dijîn. Êlên mîna Canbegan, Celikan, Bilikan, Molikan, Galeriyan, Qerecelikan, Manogriyan, Mîrîdostan, Nermikan û Sînanan erîşî ser Mîrîtiya Re me z aniye n li Edene kirin û konên xwe li Çûkurovê vekilin. Di sala 1165 an de jî ji ber germa li wir barkirin Qonya, Qeyseri, Kirşehîr, Enqere, Haymana û Polatli yê... (Filme Dirêjan). Prof. Sirma dibêje: Wexta xebara kuştina Eba gihîşte Xorasanê, alîgirên wî "Sûrhalaman" rabûn serhildanê. Çûn ser

Mansûr lê têkçûn. Di vê navbera de 100.000 mirov mirin.(98'21) Ew serhildana mezin bandora Eba Muslim nîşan dide; hîna jî li Xorasanê ew gelek bi rêz û bi ser bilindî tê bi biranîn. Di zarokatiya min de, di nava civaka Anatoliya Navîn de, Eba bi rêzeke mezin dihate dîtin û çîrokên wî dihatin qal kirin. Yanî ketibû nav ruhê van mirovan û ew bi vekirî dihate xuyakirin. Yekê jî, alîgirên wî wek Sûrhalaman tenê bi navkirin. Peyva ji Sur=sor û -alaman= al pêk hafiye ku wata vê kesên xwedî alên sor in. Ala sor û Sersorîtî koka xwe ji wir digire. Ji alîkî ve koka xwe digihêje ola Zerdeştî û Kurdên agir/roj perêst; aliyê din ve jî, dijberiya îslamê û armanca toihildana rêberê xwe.

Xorasan, bi taybet jî bajarê Meşhed ji alî bawermendên şîa yen misilman ve pîroz tê dîtin. Eewra di şere navxweyî yê misilmanan de îmamê heştan Elî Riza di sala 817 an de reviya Xorasan û li wir hate kuştin. Û wek tê zanîn bajar ji alî Elewiyên Şah Îsmaîl ve wek sembol tê dîtin.(36) îro gorek ji bo wî hatiye çêkirin ku ji her aliyên cîhanê Şîa tên serlêdanê. Di bingeh de, cîhê ku gor lê hatî çêkirin jî ne cîhê Elî Riza hatiye kuştin e. Lê xelk di baweriyê de, vêder ji bo xwe wek Kaba şîan dibine. Kesên ji derve tên vê ziyaretgehê bi evîneke mezin derî, pace û biné deriyan maç dikin û dibin 'Hecî'. Ez jî ji bo lêkolîna li ser şîatiye çûbûm wir.

Li navenda Xorasanê ji serdema Medan heta destpêka îslamê Kurd hebûn; gor lêkolînan berî Medan jî Kurd li weder jiyane. Ji destpêka îslamê heta hatina Tirkan û piştre jî, heta êrîşên Moxolan mirov Kurdan û şopa wan

bi îspat dibîne. Hinek jeder û belge, di serdema hatina Tirkan de dem bi dem agahiyên li ser Kurdan wiha rêz dikin:

Di serdema xelîfe Mûtasim de, xelîfe gelek Tirk kirin xizmeta xwe; vana, xwe bi hêz kirin û guh nedan fermanên xelîfe û tevlîhevî derdixistin. Bi vî awayî hêza xelîfe kêm bû. Di sala 870 an de Xorasan û Taberîstan û gelek

cîhên din ketin destên Xanedana Tahîr. Ji xwe re Nîşabûr û Merv kirin paytext û rêya Bexda, Maveraûnnehîr û Harzern girtî ma. Piştî wê li vê dere dewleta Samanı hate damezirandin.(136 32)Gelek nivîskar dibêjin ew dewleteka Kurd e.

Tirk di sala 1040 (hinek jî dîbêjin 1030) an de hatin Xorasan; di navbera salên 1042-52 an de jî Dewleta Şadî ya Kurd hilweşandin. Dema Tirk hatin Anadolê 19 Mîrnîşînen Kurdan hebûn.(39) Birêz Yeşîlgoz dibêje dewleta Şadî hilweşandin, lê mirov bibêje ku, girêdayî xwe kirin rastir e. Lewra dewlet hema hilneweşiya. Dema Tirk hatin bajarê Rêy xirav kirin û çûn Qezwînê, le nikarîn wira heynin. Di sala 1037 an de Oxûza erîşî Ermeniya kirin; Kurd û Erebên li wir di şûr re derbas kirin û gelek xenîmet heynan dest xwe. Di wir re çûn Urmiyê û gelek Kürden li çiya dijiyan ku bi Tirkan re her tim şer dikirin, kuştin.

Gerokê Italî Gûrzon, dİ pirtûka xwe ya bi navê "Iran" de dibêje: Li Sîstanê êleka Kurd bi navê Gerdek heye ku vana bi mêraniya xwe navdar in. Ji Kurdistanê hatin wir şûnde di sala 1245 an de dewletek avakirin û heta sala 1383 an ew jiya.(19 24) Morgonnîstrîn jî dibêje; li Heratê Kurd dijîn. Tê qebûl kirin ku ew ji Xorasan û Tacikîstanê hafine.119'30*

Di serdema Tîmûr de jî Kurd li vê herêmê hebûne û di pirtûka bi navê "Ez Tîmûrê Cîhangîr" de hafiye nivîsîn, ku dema Tîmûr tê Xorasanê rastî Kurdan tê û temaşe dike ku ew bejn bilind in û hâştiran li ser piyan bar dikin û dilê wî dikeve wan Kürden bejn dirêj. Tê gotin, Tîmûr gotiye: "Xwezî bejna min jî wiha dirêj bûya!" Tîmûr, di raperîna li Xorasanê ya di sala 1388 an de, êlên Kurd ên li Fîruzkuh şandin Xorasanê.(95'169) Piştî ûrîşûn Cengîz Xan çend salan, Şemseddîn Muhammed mîrîtiyeka Kurd li Xorasan û Sîstanê ava kir. Vê mîrîtiyê 130 salan ajot û 8 padîşah jê derketin. Di sala 1370 an de bi destên Tîmûrlenk ji holê rabû.(9 313)

Di serdema Osmaniyan, Beraniyan û Pezgewran de jî Kurd li vê herêmê hebûn. Huseyn Baykara di sala 1469 an de waliyê Pezgewran yê li Xorasanê bû. Penaberên Beraniyan di vê salé de xwe avêtin paş wî. Hesenê Dirêj jî, ji wî xwest ku ewana teslîm bike. Lê wî red kir, Hesen sê caran leşker şandin ser Huseyn. Di sala 1470 an de Hesen, Yadîgar M. Şahruhî wek waliyê serbixwe yê Xorasanê naskir.(m ,9Ü) Ihtîmaleke mezine ku ew beşekî ji Qerêmaniyan bin, ku piştre ew di avakirina dewleta Sefawî de cîh bigrin. Nivîskarê ji Kurdên Xorasanê Dr. Behrewan jî dibêje: 40 hezar Zaferanî li bajaiên mîna Qoçan, Şîrvan, Bicnûrd û Semerqendê bi cîh bû. Li wir berê êlêka bi navî Geraîlî dijî, Heroj bi hev re şer dikirin û di dawiyê de Geraîlî ji wir avêtin.(197‘15/16). Nivîskar ji bo nijada Geraîliyan tiştekî nanivîse. Lê gereg ew Kurd bin; lewra hîna jî

êlêka bi vî navî (Gera) yê li Bala-Enqerê heye û girêdayî koma Heciba xuya dikin.

Di dema Sefawiyan de Xorasan rastı êrî§ên Ozbekan dihat. Kurd di sedsala XVI û XVII an de du caran koçberî herêmê bûn. Kaîwanî (Keywanî) û Şadı hîna jî li herêmê dijîn. Di sedsala XVIII an de bi fermana Nadir Şah çend ber hatin şandin. Li Xorasanê êlên mîna: Amar, Zeferan, Şadı û Kaîwan hene. Elên li Xorasan li gorî E. Zekî jî ev in: Şadî, Zefaranî, Keyvanî û Emenî ne. Serhejmara wan 250 hezar kes in. Li Qezwînê jî êlên mîna Omerî, Bahadirî û Bisanî hene û tê gotin ku ew ji alî Nadîr Şah ve ji Xorasanê hatine wir.(19) Dr. Behrewan jî dibêje: Hukumeta Şah Ismaîl bi tîrekê li dû çûka xist; wî dizanî ku Kurd miroven şervan in û xwest wana li hember Moxol û Ozbekan bike mertal. Ristem Begê Çemişgezekî jî alîkariya wî kir... Di dema Şah Ebbas de, ji Ezerbeycan û Mehabadê 50 hezar Kurd birin. Hinek ji wan li Zencan, Takîstan û Qezwînê man û bicîh bûn. Ew yeka di sala 1007 an Qemerî de pêk hat.(,97 l4) Wek tê zanîn wê demê di navbera Sefawî û Osmaniyan de peymanek tê çêkirin.

Gor wê peymana di sala 1590 an de, Şah Ebbasê yekan Ezerbeycan, Şehrîzor û Loristan ji Osmaniyan re berda. Lê di sala 1601 an de şer dîsa dest pêkir û Persan ji bilî Şehrîzor herêmên din dîsa kirin bin kontrola xwe. Şah Ebbas ji bo ku li ber êrî§ên Ozbekan raweste 15.000 Kurd birin Xorasanê. Nivîskanê bi eslê xwe ji Xorasanê hêja Kardoxî dibêje: Şah Tehmasip di sala 1553 an de, di sala 1594 an de jî Şah Ebbas Kurd birin Xorasan. Gor lêkolîna min jî ew raste û emê li pêş li ser rawestin.

Ebbasê Mezin û Nadir Şah, Kurd ji hev cüda cüda birin Xorasanê. Ewana mîna Iraniyan Şîa tên qebûl kirin.<28) R. Blaga dibêje: Şah Ebbas (1587¬1628) ji bo ku Ozbekan rawestîne navbera 15000 heta 50000 malbatên Kurd birin Xorasanê, wê demê hejmara wan li derdora 1.900.000 bû. Nadîr Şah jî (1736-1747) gelek Kurd birin Xorasan. Reşî û Amar-lû yên li Gîlanê (Lahican, Şahrudan, rojhilatê Sefîdrud û bakûrê Qezwînê dijîn berê di navbera Erzirûm û Şehrîzor de dijiyan.'95164’ Vana ji alî Ereban ve wek Celalî dihatin binav kirin. Nadir Şah di sala 1688 an de li Xorasan ji dayik bûye, ji êla Avşar û malbateka normal bû. Berê şivantî kir, pa§ê pêne hezar Kurd û Avşar li dora xwe komkirin û li hember kralê Afgan Eşref serî hilda (1729) û ew têk bir.(l9110) Pismamê min ê hêja jî dibêje: Şah Ebbas, 45-50 hezar malbatên Kurd ji derdora Erena li Ezerbeycanê, hinek ji bakûrê Kurdistanê û hinek ji Iraqê anîn. Wana alîgirên împaratoriya Sefawî û şîa bûn. Ji ber tirsa Ozbekan, wê demê paytexta Sefawî ji Tebrîzê anîn Qezwînê. Li Tehranê cîhekî bi navê Zaferan-lo heye ku Kurdên Zaferanî girtiye. Herwiha li Sebzwarê û li Qoçanê jî heye. Piştre di sala 1000 (1600?) de Kurd hatine Xorasanê. Ji vê salé heta sala 1011 an bi temamî li Xorasan heya Merv û Bûxara û rûbaiê Ceyhûn Kurdan bi dest xist. Vê demê Kurdên Çegenî, Çemîşgezek û Zengene ku li herêma Heratê man; Çeganan ji Sebzwarê heya Meşhed, Qoçan, Merv û Bûxara belav bûn. Ji çiyayên

bakûrê Xorasan re wê demê digotin "Cîbal El Ekrad".(14510) Heman siyaset ji ali Sefawiyan ve jî hatiye meşandin. Nadir Şah li hember erîşen Ozbekan ji Erdebîl, Tebrîz, Şoregul, Gencê, Mako, Meraxa, Mahabat û Kûm ê jî 25.550 Kurd birin li Kandahar, li Sindistan û Xorasanê je hêzên peşOng pêk anîn.(2S| Weka hinek mînakan min da, ji berî Medan bigre heta roja îro ti caran Kurd ji Xorasanê kêm nebûne û herde m bûye welatê wan. Bi taybetî jî herêmên çiyayî yen alî Afganîstanê, bakûr û bakûr rojavayê Xorasanê jî welatê Kurda bûye. Wekî di beşa Sumeriyan de jî min gote, li gor belgên wan îhtîmaleke pir mezine ku ew ji alî Xorasanê ve hatine başûre Mezopotamya. Ji bo vê jî dîtinen ku dibêjin Xorasan welatê Tirkan e û yen ji wir hatine jî Tirk in ji binve şaşe. Şaristaniya ku ji wir hate Anadol û Sûriyê hemû malê Kurdan e. Wekî tê zanîn muzîk, ol û gelek kevneşopiyen din ji wir hatine. Ji Mewlana bigre hetanî H. Bektaşî Welî û yên din şopa Kurdan li ser wan e. Elewiyên îro bi tirkî diaxifin, şopa çand û ola Kurdan bi giranî li ser jî Kurden zû hatine Anadolê û hatine asîmîle kirin in.

Li Xorasan Kurd ji Farisan re dibêjin "Tat". Tat jî; li Ezerbeycan, Gîlan, Mazenderanê ji zimanê xwe re dibêjin Tatî û xwe jî wek Tat bi nav dikin. Di Lûgat-î Tirk-cîldê II an de jî tê qalkirin ku Tirk bo hemû Farisan peyva Tat bikar tînin.. .Di dema Sefawiyan de jî ji bo nişteçîbum Iranê bi kar anîne. Hinek lêkolîner zimanê Tatan berdewamiya zimanê Med dibînin. Hinek şîa ne, hinek jî (Xalxal) şafiî ne. Di ola wan de şopa Zerdeştiye heye.(9M36) Li Gîlanê Gîlekî, yan jî Reştî jî hene ku zimanê Aryanî deng dikin. Gîlanî xwe wek Iraqî binav dikin. Gîlekiyan di sala 933-1055 an de dewleteka bi navê Deylemî-Bûveyhî (Malbata Misafir-Salarî) avakirin. Dawî li desthilatdariya Ereban anîn. Gîlekî gelé li hember îslamê yê berî dirêj li ber xwe daye.(95'146) Bi qasî min çavderî kire; Gîlekî şaxekî Zazayan e, lê pêwîste ew hîn kûr bê lêkolîn kirin; bi taybetî li ser zimanê

wan ew bê kirin. Wek tê zanîn, ji Mûsil û Kerkûkê jî gelek mirov reviyan Gîlanê û xwe veşartin.(y5'15ü) Li vê herêmê sê zaravayên kurdî tên axaftin; lê herêmêka ji bo lêkolînê zimanê Arranî kilît e. Eger bi kûrahî bê lêkolîn kirin, dikare rê li ber gelek îspatên dîrokî jî veke. Em hêvîdarin, zimanzanên Kurd vî karî rojek ji rojekê zûtir bikin.

EBA MUSLIMÊ XORASANÎ

Li ser kok û binata Eba du îddea hene: Yek, Navê bavé wî Evdilrehman û navê wî jî Ibrâhîm e. Dîlekî ku di destê êla Benû Ici de gir bûye. Ji bo tevgera Ehlî Beyt nêzîkayî nîşan da û paşû jî kete vê hereketê û çû Xorasanê. Ya diduyan, Eba di sala 718 an de li gundê Mawitê ku li Ezerbeycanê ye, di mintiqa Kurd lê dijîn hatiye dinê, Bi navê Ibrâhîm bin Heyyekan (Hetekan) tê nasîn. Navê bavé wî Evdilrehman e. Hîn zarok bûye bi malbata xwe ve dibin esîrê malbateka Ereb. Mirovekî kin, tijî û laşekî sportmen û esmer bûye. Eba girêdayî koma Rewadî ye. Ew jî ji 11 élan pêk tê. Eba, girêdayî fikra Batinî ye, ku ew jî îslamê

û ji Şîîtiye dûr e. Paşe bû mirovê Ebbasiyan.<57)

Herdû ditin jî nêzîkî hev in, bi dîtina min jî evv Kurdekî ji Ezerbeycanê ye. Ji bo ku evv ji federasyona Revvadî ye, mirov dikare beje ew kesekî ji kon/ federasyon êlên mîna Şadı, Reşî yan jî Badilî ya ye.

Şaire Ebbasiyan Ebu Delama ji bo wî vviha gotiye:

Ey Ebu mucrîm (mêrkuj)!

Te xwest bêbextî li Mansûr bikî Bapîrên te yen Kurd jî xayin bûn Te ez bi kuştine didam tirsandinê Lê, şeıe mezin te bi desten xwe parçe kir.

Ew helbesta jî dide xuyakirin, ku ew Kurd e û dema neheqiyan an jî şaşitiya xwe dibîne û şivar dibe, ew bi xayintiyê te tewanbar kirin. Lewra, xuyaye ku Eba bi hestên pak û hêviya edaletê tevlî Ebbasiyan dibe. Pişt re rastiya wan dibîne û wiha dibêje: "Vana ez xapandim!"

Di dema Eba de gelên li Xorasanê di bin zilma Erebên misilman de dinalin û ew herêma bûbû qada tekoşîna Emewî û Ebbasiyan. Ji bo ku gelen li wir bi rêxistin bike, M. Bin Elî, 12 mirovên xwe yen baş û Eba Muslimê Xorasanî (718-755) di sala 745 an de şand Xorasanê. Bi iêbertiya Eba li Xorasan propaganda Ebbasiyan bû, xelk hate bi rêxistinkirin û dest bi serhildanan kirin. Xelkê herêmê li dora Ebbasiyan kom bûn û li dijî Emewiyan muxalefet dikirin. Eba, li Mervê axaftinekê dike û wiha dibêje: Serhildan meseleyeka civakî ye. Bi marifete §êx, axa û began pêş nakeve. Serhildan bi hilvveşandina Emewîyên bê esil tenê bi sînor kirin. Ji bo ku em mafê wan zarokên ku hê mû di rûyê wan de derneketî bistînin; li dijî efendiyên Ereb, ev serhildana ya êl û miletên mazlûm e. Ev serhildana Kurd, Tirk, Harzemî yan; ya kolan, ya xulaman e. Ev serhildanên li hember kesên li dijî Ehl-î sûnnetan, Şîan, Elewiyan, Batiniyan, Zerdeştiyan, Xariciyan, Bûdîst û Manî yan e.(36) Di daxuyaniya wî de rengê wî jî diyare, ku wî sîstemekî bo hemû gelan û bo hemû baweriyan ji xwe re kiriye armanc. Li hember misilmantiya sunnî û tehdîta wê, olên cîran jî dawetê tökoşînö dike. Li ser wê babetê birêz Ocalan jî wiha dibêje: Eba Muslim û Imam Elî, feqîr çavdikirin, adilbûn, bi prensîp bûn û girêdana qebîla vê re tunebûn. Ji ber ku sazî avanekirin, di sînorên terîqetan yên teng de, veşartî kar kirina wan bixwe re gelek tiştûn nexweş jî anîn.<72)

Di dema Eba de li Xorasanê; Xûrremîtî, Elewîtî, Îsmaîlî, Keysanîtî û Şîîtî belav bû. Eba, serhildana Şorek/Şerîke Şîî/Elewî têk bir û di vê demê de 600 hezar mirov hatin kuştin. Şere navxweyî jî hebû û gelekan dixvvest bila yekî ji malbata imam Elî were ser texte xelîfetiyê, lê Eba, qet erîşî oldarên Zerdeştî nekir û navbeyna xwe wan baş bû. Oldarên Zerdeştî alîkariya Eba dikirin û beşdarî şoreşa wî bûn. Eba, li dijî mezhebên ku ji Zerdeştî veqetiyane jî bê merhemet bû. Çav li wanê bi navê "ji rê derketî" venedikir. Kurdên Xorasanê ji bo ku di felsefa Zerdeştî de bûn û ji bo ku

ola xwe biparêzin bi Erebên misilman re ji dil şer dikirin. Wekhevî ji bo wan girîng bû. Iro karektera Kurdan ya ku 'berê xelk, paşe xwe difikirî' ji wê felsefê tê. Wek birêz Bûlût jî dibêje armanca wan "Wekhevî, bi hevre parvekirin û şirîkatî bû. "

Elinek nûser dibêjin: Li destpêka tevgerê, Eba, li nêzîkî Mervê bi dizikî kar kir û di sala 129 an Remezana 25 a, yanê 9 Temmuza 747 an de derbasî pê§ mirovên temamî cilên reş lixw'e kirî bû û serhilda. Cilên reş dihatin mana şîna kesên (Ehlîbeyt-Elî) li Kerbela hatine kuştin. Ala reş dihate mana li dijî Emewiyan serhildan û berxwedan. Ji bo wan kincana dîrokzanekî rojava dibêje "îblisên Reş".(%) Li ser vê îddeayeka din jî heye ku dibêje: wana alên sor bilind kirin. Bi dîtina min, herdû jî rast in. Li destpêkê gelen wir, cilên reş ji dîrokêka dûr û dirêj digirtin ku me qala Çuxreşiyan kiribû; pasê bandora şehîden Kerbelayê jî heye û reş kevneşopiyeka dîrokî ye. Bi ser vê yekê jî alên bi rengê sor ji bo toia Eba hilgirtin û erîşî Ebbasîyan kirin. Lewra piştî tûkoşînûn bi Eba re girêdayî, sersorî-qizilbaşî bi pâş dikeve û Kurdên ji vê kevneşopiyû tên jî cilên sor hîn zêde lixwedikin û sor li cem wan hîn watedar e... Piştî ew şer û tekoşînan jî navê wan bi temamî dibe "Alasoran"... Eba, di sala 747 an de bi rêvebirê Emewiyan yé li Xorasan Nasr bin Sevvar re dest bi şer kir. Di sala 749 an de li bajarê Merv ala rizgariyê bilind kir û di heman salé de îdara Emewiya hihveşiya û şûna wê îdara Ebbasiyan destpê kir. Arteşûn Emewiyan yen hatin ser Eba Muslim hemû têk çûn û di sala 749 an de bû desthilatdarê bi giştî yê herêma li rojhilatê Dicle.(,0,'30> Armanca wî azadiya gelan bû: Kurd, Faris, Erebên Şîa û Elewiyan xwe li dora Eba civand û ji Xorasan heta Mûsilê hevaltiya wî kirin. Lê di vê demê de bûyereka girîng jî qewimî: Dema Eba serhildanê li dijî Merwanê Emewî destpê dike, Kurdên El-Cezîrê ranabin û alîkariya wî nakin. Kurdên Xorasan, Ezerbeycan û el Cibel xwe zarokên Eba dizanîn û rabûn

serhildanê. Kurd bûne du beş: Evên li Amed, Farqîn, Cizîrê, Nisêbîn û Mûsilê girêdayî Emewiyan bûn. Mumkune ku sedemê vê xwarziyê Kurdan Xelîfe Merwan yan jî yen wê herêmê êdî bi temamî misilmantî qebûl kiribûn û nedixwestin careke din seiê xwe bi Ereban re têxin beiayê be. Bi dew'leta Emewî re li dora bajarê Şehrîzor û çemê Zê şer çêbû. Eba gelek xelk cia dora xwe û arteşa Emewiyan li sala 748 an li Nehavend, piştre jî li Kirmanşah û Şehrîzor kire dest xwe û di sala 750 de xelîfê Emewiyan Merwan kuşt.<12570) Gor hinek jêdeiên din jî bûyer cüda bi encam bûye: Eba, li destpêkê di bin fermana lawê Muhammed Îbrahîm de bû. Paşû ewr li Harranê ji alî Merwfan II

an ve hate îdam kirin. Bi ser vê de ew ketin bin kontrola pismamê Mihemmed Ebbas. Di sala 750 an de Eba arteşa Emewiyan li Sabê têk bir û kete Şame. Eskerên Emewî hemû û Merwan hate kuştin.(lül'3l) Cemil Paşa jî dibêje: Li Mûsilê hêzên Eba bi xelîfê dawî Merwan re cengeka mezin lidarxist. Merwan reviya Filîstîne. Eli îbn Ebdullah (apê xelîfê nû) kete dû û ew kuşt. Ji torinê Elî, Ebû Ebbas Bîn Ebdullah bû xelîfe.(9'l58> Ebûl Ebbas Abdullah (xwînrij) li bajarê Kûfê xelîfe hate îlan kirin. Bi ser vê de serdema Ebbasiyan destpêkir û şûna îdeolojiya sûnnîtîya hişk, Batinîyan îdare heynan. Demekê pişti reva Merwan, beşek Kurd jî ji dora Filistînê berbi bakûr hatin û li dora Amedê bi cîh bûn. Di nava wan de êla bi navê Sewêdî jî heye ku emê li pêş li ser rawestin.

Gelek jêder diyar dikin ku Eba di dema xwe ya dawî de, raman û nêrînên xwe li ser sîstema Ereban guhartiye; ew yeka ji devê Eba wiha tê şirove kirin: "Min ji malbata Bêxember bi kesekî bawer kir, wî jî ez xapandim! Kur'an berovajî kir û ji bo berjewendiyê xwe bi kar anîn. Xwedê ji nişkava ez şiyar kirim, min fêhm kir ku ez alîgirê neheqîme" bi ser vê guhartinê ve ew ji alî Al Mansûr ve di sala 755 an de hate kuştin.(,m‘3,) Birêvebirên Ereb, ji rêbertî, xelk bi rêxistin kirin û bandora wî ya li ser gel û ji

şiyarbûyîna wî ya netewî tirsiyan. Ebbasiyan dîtin ku ewê pê§êrojê ji bo Kurdan û ola wan jî têbiko§e û li hember wan derkeve; ji bo vê jî hema li destpêkê ew bê bandor kirin. Eba dawet kirin, wexta kete hundirê qesrê ji alî xelîfê Ebbasî Ebu Cafer al Mansûr ve bi namerdî hate kuştin (754-55), laşû wî parçe kirin û avêtin çemê Dîcle. Bi ser kuştina Eba Muslim de bi dehan serhildan li Xorasan û Kurdistanê pêk hatin. Bi sed hezaran mirov di şeıûn bi xwîn de mirin. Ji bo ku heyfa Eba bistînin bi dehan êlên Kurd ku îro neviyê xwe li Anadolê ne hatin ser Ebbasiyan û sê mehan bi wan re şer kirin. Bi vî awayî jî beşek Kurd wê demê ji Xorasan hatin Kurdistanê û piştre jî hatin Heleb û Anadoliya Navîn. Di nava wan Kürdana de, Eba ji rêberekî zêdetir wek pêxemberekî bû.

Iro li ser Elewîtiya Anadolê em vê bandore hîn zêde dibinin; ew yeka ji alî olî, civakî, kinc û folklerê de eşkere tê dîtin. Bê gu man ew tevgera bi ser biketa û li Anadol, Arran û Kurdistanê bibûya dewlet îro rews cûda dibû. Ji vî alî ve nîvcû ma û Eba nedixwest bibe mirovê yekemin. Ji bo ku Eba ji kevneşopiya Zerdeştî dihat, wî serokatiya dewletê qebûl nekir û ji bo wê teklîf ji Imam Caferi Sadık re bir. Kuştina Eba bû çekeka li hember Ebbasiyan û gelé xwe li dijî wan bi rêxistin kir. Hema piştî kuştine êlên ji Xorasanê hatin bi Ebbasiyan re sê rriehan bê navber şer kirin û têk çûn. Pişti wê di sala 764 an de, Kurdên Mûsilê serhildan û vê bandora xwe li der û dorên din ji kir. Di serokatiya Al-Mukanna de di sala 777 an de li Xorasanê serhildanê destpêkir û sê salan ajot. Di sala 793 an de li Cizîrê Haricî Fadil rabû.(125 72) Serhildanên ji bo Eba û li dijî misilmantiyê yên wê serdeme, nêzîkî sed salan ajot ku wek agir herder şewitand.

Beşek Dîroknûs dibêjin: Di sala 809 an de di navbera ber namzetê xelîfan, El Memun û El Emin de tekoşînekâ destpê kir. Xorasanî dîsa derbasî

berxwedanê bûn û herêma Tibet, Kabil û Cîgavey ji kontrola misilmanan derxistin. Ji bo Xorasanê, wê demê Eli Reza bin Mûsa bin Cafer ibn Ebî Talibe ji Medine wek berpirsiyarê gîştî hate şandin. Va tayina (817/8) ji bo Xorasaniyan memnun bikin kiribûn, bi ser vê de gelé herêmê cilên xwe yên reş bi yên kesk ve guhartin.(36) Bi dîtina min ew zêde ne di cîh de ye, iewra, gelé weqas xw7în rijandî bi rêvebirekî re hema cilên xwe naguhure. Dema mirov li vê herêmê diğere dibine ku hîna ji di nava Kurdên li Xorasanê de rengê heri zêde bi kar tê sor e. Kincên Kurdên wir ji seciî notî ji rengê sor û pir hindik ji şîn in. Lê di nava şîayen wir de hîna ji reş rengê ku tê tercih kirin e. Prof. Sirma ji dibêje: Memnun nêzîkî Şîîtî yê bû ji ber vê ji ji gelé xwest ku cilên xwe yen reş bi yen kesk biguhurin/98 76> Hîna jî li Xorasan alên reş li mizgeftan û malên şînû tenê daliqandin.

Bi kurtî be jî min hewl da ku jiyan û tekoşîna Eba Muslim li ber çavên we raxim; guman nine ku ew Kurd bû. Heta vê demê jî kesekî mina wî yê bi Kurdan ve bûye yek can û hest nine. Kalên min, berê wexta xwe bi çîrokên Eba derbas dikirin; gelé me yê li Xorasan dema qala wî dikin pir pê serbilind in û pir jî rêz digirin. Bandora wî yê di nava Farisan de jî heye. Eger ew ne Kurd bûya bi vî xelkî re weqas dibû yek? Piştî qetîlkirina Eba gelek tevgerên tolhildanê derketin; gelé Kurd û yên din ên dijî Islamê bi wan re weqas bûn yek ku piştî demekê ew tevgerên eskeri bûn mezheb û teriqatên cûda. Niha em hinekan ji nêz ve nas bikin.

Mezhebên Cûda û serhildanên bi dû Eba Muslimê Xorasanî

1- Xûrremîtî (Sûrhalaman):

Di dîrokê de li ser Xûrremîtiyan zêde agahî û belge nînin, ewên ku heyî jî piranî yên nivîskaren Ereb in û Xûrremîtiyan wrek mirovên dinyayê yên herî

xirab nîşan didin. Xûrremîzm ji alî gundiyên di bandora Zerdeştî, Mazdekî û Manîzmê de mayine ve dihate destek kirin. Nizamul Mülk, di berhema xwe ya bi navê "Siyasetnamê" de Xûrremîtiyê vviha tarif dike: " Mal di navbera mirovan de hevbeş e, ti kes ji vvî mafî maxdûr nemîne. Ji bo wê herkes male xwe derxiste hole. Gor wan, zilim û neheqiya cîvakî tarîtiyê temsîl dike û ji bo wê qet bi misilmanan ve lihev nekirin. Wexta Mazdek kuştin bi şûnve, jina wî Hûrrem Bintî Kade bi dû meriyên xwe ve ji Medya reviya û çû bajarokê Rêy û bangî gelé kir ku di riya mère wê biçin. Ji bo wê, kesên ketin dû felsefa jinikê re gotin ewê bi ola Xûrremîtî re. Di demeka kin de li her cîhekî belavbûn û li her bajarekî navek heynan. Batinî jî bi wan re bûn yek û li her cîhekî serî hildan. Ji wan re: "Mûhamîra" yan jî "Qizil" yan jî "Alasoran" digotin.(l25‘73) Di wir de navê Alasoran girtina wan girîng e, ku bingeha xwe li dijî şovenîzma Ereban, sîstema wan ê înkar û îmha yê wek mirovên azadî, wekhevîxwaz û ji bo wê jî amade ye ku her tiştekî bikin e. Di roja îro de ji berdewamiya wan re Qizilbaş tê gotin ku dîroka xwe ji vir tê. Mazdekiyan û Xûrremîyan wek sembol di cil û alên xwe de sor bikar anîne. Ji bo wê bi navê "Sûrhalaman-Ala Soran" derbasî dîrokê bûne. Ew yeka di dema qizilbaşiye de dîsa derket hole.*154"257* Peyva Sûrhalaman îro jî di Kurdî de tê vê watê. Sur=Sor e, -ala=beyraq/al/perçêm ê, man jî dikare di cîhê piranî yan jî di wata şexisan de bê bikar anîn. Dîroknûsê Kurd Tori, felsefa Xûrremîyan wiha şirove dike: Vana, bingeha neheqiyê di xak û civakê de didîtin. Jin jî di nav de, dixwestin di her aliyê civakî de wek heviyê pêk bînin û xwe ji bacê rizgar bikin. Li dijî xanedaniya Ereban û Islamê tökoşîneka mezin dan. Di dema Ebbasiyan de Xûrremîtî bi Şîa ve gelek nêzîkî hev bû. Tespîta nêzikbûna Şîa jî raste; lewra, di demê re Xûrremîtiya radikal cîhê xwe ji Şîatî û Qizilbaşî yê re hişt. Poladyan jî kesên bi Alên Sor wiha şirove dike: "Kesên ji bo azadiyê amade ne ku xwe feda bikin.." Gorîjêderên Sûriyê,

dema Babek li Kordûenê (Başûre gola Wanê, nivîskarên din jî vê peyvê di mana Xûrramî de bi kar tînin.) serî hilda pir çalakbûn û alîgirên wan digihîştin 200 hezarî. Ebu Mansûr Bexdadî dibêje: "Babek ji Ezerbeycan û Deylemiyan 300 hezar kes didît."<;>7) Heta vir min gelek caran nivîsî ku Kurd ji Ezerbeycanê qet kêm nebûn; Kurdên wir bi piranî jî kurmancî axêf in. Deylemî jî gelek caran di wata kurmanckî axêfan de xuya dike. Bi vî awayî em fêr dibin ku wê demê jî di nava wan Kurdan de tevlîhevbûnek pêk hatiye. Niqta din ê girîng jî serhejmara wan e. Ji vê jî derdikeve holê ku ew girseyeke pir mezine, raste jî. Ji wan jêderên Sûriyê jî tê îspatkirin ku Xûremî Kurd in û gelek nivîskaran din di şûna Xûrremîtî de Kordûenê bi kar anîne.

Xûrremîtî di bin bandora 'wekhevî û şirîkatî' ya Mazdeyî de man û milê Mazdeyî yê Batinî/Elewî yê ku navê Gulat-i Şîa lê dihat kirin. Bi vê re bi Soralan ve bûn yek û bi navê Mazdakîa giştî hatin nasandin. Dîrokzanê misilman dibêjin: 'Tevgera Mazdakî, di dema Islamê de jî li herema Kurdistanê berfireh bû, endamên wê bi rêxistina Keysanî (milê radikal ya ji rê derketî a Batinî) ve bûn yek û li dijî Islamê muxalefet dikirin. Fermandaiê Ebbasiyan ê li Xorasanê

Ammar bin Yezid (736) ji ber tevgera xwe li bajarê Mervê, ji ber "endametiya tevgera Xûrremîtiyê" hate mahkeme kirin. Navê xwe yê kod Hidaş bû û hate darvekirin bi şunda jî bi wî navî tevgerek derket holê. Endamên wê iddîa dikirin, ku îmamtî ji M. Bin Alî derbasî Ammar bubû û bawer dikirin ku ewê rojekê dîsa vegere. Xûrremîtî bi (Eba)-Muslimetiyê ve bûbûn yek û ew bawer nedikirin ku Eba miriye û ew wek xwedê û pêxember didîtin. Beşekî jt bawer dikir ku ew miriye û îdîa dikirin ku mafê îmamtiyê yê keça wî Fatma ye (gor hinekan jî navê wê: Mênîcxan e). Ji wan re jî mile "Fatimî" dihat gotin. Bi dîtina min navê wê yê esas divê Mênîcxan be; Fatma navekî erebî ye.

Di dîrokê de cara yekemîn di salên 778-79 an de qala Xûrremîtiyê tê kirin.' Nîzamulmulk dinivisîne ku: " Di dema Xelîfe Mêhdî de, Batiniyên Gorgan bi Xûrremîyan ve bûn yek û gotin; ku 'Eba Muslim dijî!' Dema Harûn el Reşîdî li Xorasan bû (807-809), Xûrremîyan dîsa ji Esfehan, Tarmedeyî, Fayekê serî hildan û ji Rê, Hemedan û Destê gelek mirov hatin tevlî wan bûn. Hejmara Batinî û Xûrremîyan zêde bû, lê têkçûn û zarokên wan li Bexda hatin firotin. Heman dîtin ji alî Ebu Muhammed Abdullah Ibn-Esat Yafeyî ve jî tê gotin: "Xûrremîyan di sala 808 an de li Ezerbeycanê serî hildan. Di sala 833 an de gelé Hemedan bi piranî ola Xûrremî pejirand û serî hildan. Xelîfe Mûtasim, îsheq Ibn-Ibrahîm şand ser serhildanê û wî jî 100 hezar kes kuşt, gelek mirov anîn Bexda firotin û even man jî reviyan cem împaratorê Bîzans Teofîl. Ji vê bûyeiê 9 salan bi şûnde Babek li Ezerbeycan serî hildan û heta sala 913 an gelek mirov mirin. Di tevgera Xûrremîtiyê de taybetbetmendiya herî girîng ewe, ku ew ji cografyeka pir fireh piştgiriye digirin; yan jî ew yeka bi hêsanî pêk dihat. Sedema vê yekê jî ewe, ku gelên Kurdistanê û Pars Zerdeştî bûn û di her fersendê de di dijberiya Islamê de digihîştin hev. Bi vê re girêdayî tê gotin, ku Xûrremî, bi Muhemmîre yan jî bi-alasor e li Teberistan (Gîlan-Başûre Hezar) û Gûrgan; bi Mûbeyyize (Kinc Spiyan) li Maveraûnnehîr û bi Mugana yên ser-çavên xwe bi maske re di eynî bîr û bawerî û olî de bûn. Mumkune ku serokê Babek li Ezerbeycan bi Mazyarê Teberistan ve di nava îttîfaq û yekîtiyê de bûn.

Saïd Nefîsî dibêje: Xelkên bi navê Xûrremîyan li herêma yiya yê bi navê Bezz (Bozzeyn) a li Ezerbeycanê (Arran) dijî. Ew jî di navbera Derya Kesk û Bakûrê Gola Ûrrniyê de ye. Wekî dm jî Xûrremî li Ezerbeycan, Xorasan, Kirman, Hemedan, Rey, Samyan, Qazwîn û li gelek cîhên din ên çiyayî dijîn. Hemûyan baweriya xwe bi ola Mazdek dianîn. Ji gel e li herêma Arran dijî re iraniyan ji benê ve digotin Alan/Alanî. Paytexta xwe berî

Islamê Kevaiek bû û Ereb dora salên 643 û 655 an de hatin.(41) Wekî berê jî me nivîsî ji êleka Dimilî re Alan tê gotin ku ew ji bakûr hatine dora Dêrsîmê. Hinek dîtin jî hene ku dibêjin ew berê li Esfehanê jiyane û bi êrî§ên Ereban re çûne bakûr.

2- Serhildana Babek:

Flinek dîtin û jêder, bi taybetî jî yên Farisan îddea dikin ku Babek Paris

e; le ew ne raste. Gor ragihandina Ebu Hanife Dinevarî ya di pirtûka bi navê "Ehbar el Tival" de dibêje: Babek, kurê Mûteherrine Fatima keça Eba Muslimê Xorasanî ye. Yanê xwarziyê Eba ye; me li jor qala nijada Eba kiribû. Orner Tamîmî jî dinivisîne, ku Babekî ji eslê Nebtanî ne (yan jî Nebtiye Sevadan) kurê Abdullahê ji Medainê ne. Diya xwe jî ji gundê Bilalabad (Kelanrûd) Mimeda li Ezerbeycanê dijî, jineka navê xwe Brûmid/ Bûrûmend û çavekî xwe kor bû. Navê bave wî jî Merdes bû. Ji koka Sevad yan jî Sewêdî ne? Wek tê zanîn êlaka Kurdan bi vî navî heye û di serî de li Anatoliya Navîn, Amed û gelek cîhên din belav bûne. Di beşa élan de emê bi firehî qal bikin lê ew êleka pir girêdayî kevneşopiya çanda xwe ye û di dema ji Xorasan êlên Kurd ji bo tola Eba hatin, ew jî di nav de bûn û piştre jî hatin Anadolê. Taybetmendiya wan a herî mezin jî, bere şak?n sor li xwe dikirine û ji kincên sor gelek hezdikin. Elên cîran ew yeka tanê dikirin /didan ber pozî wan ... Dema mirov li pêvajoya wan ya dîrokî, çand û bûyeran tîne cem hev, ne dûr e ku Babekî ji koma Sewêdî bin û têkiliya wan bi Sefawiyan re jî hebe! Ela Sewêdî, êleka pir girêdayî Eba Muslimê Xorasanî xuya dike; bi hêza wan û êlên din, Eba Emewî têk biribûn. Piştî wan jî rêvebiriya Ebbasî hatibû û em dibînin ku Sewêdîyan bi Ebbasiyan ve di nava gelek têkîliyên xweş de ne. Yekî bi naw Bermekiyan yê ji vê êlê bûbû wezîrê Ebbasiyan. Piştre ew jî rastî xiyaneta Ebbasiyan hatin û wana jî koç kiribûn. Ji bo ku bavé Babek jî navê xwe Merdes e bûyer hîna jî balkêştir dibe. Bi navê Mirdêsî jî êleka mezin heye

û nêzîkî Sewêdiyan e û li Anatolî ye cîranê hev in. Her dû êl jî di nava êlên ji Xorasan hatine û bi Ebbasiyan re sê mehan şer kirine de tên dîtin. Sem'anî di kîteba "Kitab el Ensab" de dibejê, ew ji mirovên kurê Merdas Babek in. Heta navê Bermekiyan jî mumkune ji Babek hatibe. Gor rîwayeteka din jî ew ji binemala kurên Mutahharan in; digotin Mutahhara Ibn-Fatima. Xuyaye ku herdû îddea jî nêzîkî hev in: Herdû jî digihîjine keça Eba Muslim Fatima û di alî olî de jî Babekî di şopa Xorasanî de ne. Torî jî dibêje, ew ji Arran (Ezerbeycan) e û ji ola Xorremî ye. Babek, kesê herî mezin ku xwestiye mezheba Xorremtîyê belav bike ye. Xorremtî mile Mazdekî yê herî mezine. Xemgîn jî dibêje: Babekî Xoremî ji Kurdên Mazyar û ji malbateka normal bû. Xelkê Kurd ji dewletê bûbû kolê û neçar dima ku xizmeta Ereban bike. Ji bo vê neheqiyê, Babek xelk bi rêxistin kir û li Al-Badd ew pêşva çû. Li bakûrê Kurdistanê gelek cîh rizgar kirin. Di sala 816 an de li kudera Kurdistan amedekarî temam bûne nayê zanîn lê di raperîna çêbûye de artöşa Kurdan bi serketiye.(lül'37)

Birêz Izady aliyekî din ê Babekî balkâş dide xuyakirin: Biryargeha Babêk li Ezerbeycanê di nav Kurdên koçber de bû. Gor baweriyê, di tevgera Xûrremîyê de, ruhê serok û şexsiyetên olî, ji kesekî derbasî kesê din dibû. Cîhê ku wek Hecî Bektaşî tê nasîn, îhtîmaleka mezine ku cîhê ku Narseh lê bi cîh bûye.(154-257> Ew Kurdên ku me li jor wek nijada Babek da xuyakirin jî Kurdên koçer bûn, Ezerbeycan warê koçeran bû, ew jî îspateke ku Babek û bi wî re girêdayî Eba yî ji Kurdên îro li dervayî welat in. Bi vî awayî Babek jî pişta xwe

dida Kurdên koçberên li Arran û yek ji wan bû. Wekî me li jor jî gote: pêvajo ya dîrokî, çand, kincên sor û di alî olî de jî ew didin xuyakirin ku Babek yek ji Kurdên koçber bû. Heta mirov dikare bibêje ku ewî ji alî dê (dayik) ve ji êla Sewêdî; ji alî bave ve jî ji êla Mirdêsiyan bû. Mesûdî dinivîse ku: "Nasirê Kurd- Narseh" tevlî Babek bû. Ebbasiyan di sala 833

an de 60 hezar merxasên wî kuştin bişûnde, xwe avêt paş Bîzansiyan. Wana jî Nasir li nav gelé wî, li bakûrê navenda Anadolê, li Pontûsê bi cîh kirin.(154‘102) Li ser vê bingehê mirov dikare bêje gelo wê demê Sewêdî û Mirdêsî li dora Enqera, Eskîşehîr û Haymanayê bûn? Ez nikarim bêjim erê, lewra ew êlên em qal dikin wê demê li Kurdistanê ne. Ew jî lêkolînên kûr dixwaze.

Piştî qetilkirina Eba Muslim, vê tevgeiê 90 hezar kes komkirin û serî hilda. Serhildana herî mezin ji alî Babek ve pêk hat. Raperîn di sala 816 an de li Esfahanê destpêkir, Xorasan, Ezer bey can û rojhilatê Kurdistanê jî kirê bin bandora xwe, lê di sala 837 an de têk çû. Ideolojiya wê Xûrremîzîm bû ku ji gundiyên di bandora Zerdeştî, Mazdekî û Manîzmê de mabûn ve dihate destek kirin. Alên Sor hildigirtin ku di tâkoşîne de, sembola ji bo azadiyê xwe fedakirinê bû. Di hinek jêderan de dibêje ku: Piştî Babek, Xûrremîtî bûne du beş: yek aliyê Alasor û yen din jî Babekî ne.(125‘93) Babek bajarê Rê heyna bişûnde got Eba nemiriye û ewê di demeke nêzîk de bi Mazdak û Mêhdî re tevhev vegere û armanca wî ya esasî ewe ku Kabê hilweşîne...

Tevgera Babek, nêzîkî 100 salan li dijî Ebbasiyan têkoşiya. Wê demê Ezerbeycanê nêzîkî 300 salî Kurd heynabûn nava xwe. Ew der bû cîhê Kurdan ya dawî. Yakûbî (891 PI) de dinivîse ku: Nifûsa Ezerbeycan ji du gelên Îranî pêk tê; yek Azerî ne yek jî Cewanî (Caf) ne. Gor Hawafî jî: Babek ji nav Cewaniyan derket û dest bi tekoşînâ kir. Li çiyayên rojhilatê Ezerbeycan Sabalan, êlên Kurdên mîna: Belikan, Gerger û Badh bi cîh bûbûn. îro jî ew wek Belikan, Baz û Bazaynî hene.(154101> Bi dîtina min Cewanî bi Cafan ve ne yek in, Caf Kurdên bi giranî Soranî û çend şaxen Lerî axêf in. Îhtîmaleka mezine, ku Cewanî navê Celaliya yê kevn e. Eger Babekî ji Cafan be, dîtinen me li jor nivîsîne jî vala derkevin. Bi dîtina min

jî ew ne ji Cafan e; lê dibe ku ber sê federasyonan (Sewêd, Mirdês û Caf) wê demê îttîfaq jî kiribin.

Xûrremîyan, di salên 787, 815, 827, 833, 838 an û geiek carên din li dijî Islamê serî bilind kirin. Serhildana dawî 22 salan ajot. Bi taybetî jî dema Babek, arteşa xelîfe ya herî baş û serleskerên herî bi tecrübe şandin ser eniya Xûrremîyan û di her carekê de jî Babek ew têk birin û gelek fermanderên bi nav û deng kuştin yan jî esîr kirin. Mûtasim (833-842) tirsiya û lawê Kaûs Afşînâ Kurd şand ser Babek. Bi salan li Ezerbeycan şer kirin; di dawiyê de Babek wende kir (837) û reviya. Dixwest here cem Imparatore Bîzans Teofîlê ku çend caran ji hevre mektup şandibûn û alikarî kirîbû. Di vê navberê de Mazyar li Taberistanê serî hilda. Babek, ferman da kesên agirperest û Mazyar ku têbikoşin heta ji misilmantiyê tiştek nema. Babek dema dixwest bireve, di rê de yekî Ermeni ew xapand û teslîmê Afşîn kir (838). Arteşa Babek,

ku ji Ezerbeycaniyan û Deylemiyan ya ji 300 hezar leşkerî pêk dihat nêzîkî milyonek misilman kuştin. Lê di dawivê de ew lehengê Kurd, biraye wî û malbata wî bi merasimeke qet nehatî dîtin birin Bexda cem xelîfe Mûtasim. Li huzura Mûtasim destê wî yê çepê jêkirin, wî xwîna xwe di rûye xwe da û got: "Wextê xwîn diçe, rûyên mirov zer dibin û bila kes nebêje ku ew tirsiya!" û di heman demê de dibêje " Asanya=hêsan e!"(125'94) Di nava Kurdên li Xorasanê, bi taybetî jî di nava Kurdên Şadî de, berê, dema leşker diçûne şer, rûyên xwe bi sor reng dikirine ku dema birîndar bibin bila xuya neke; dost dil eş, dijmin jî pê şa nebin û cesaret negirin. Mirov dikare beje hema hema ji sedî sed ew kevneşopiya ji Babek ve hatiye. Mümküne Medan jî dikiriye, lê ji bo ku heri dawî Babek kiriye, mirov dikare bike male wî. Yekê jî wêneyên Babekê ku hatine xêzkirin bi yen Kurdên Şadî ve hema hema yek e.

Şervanâ Şadiyan ê bi rûyê sor

Li ber çavên xelîfêhov dest, lingû serê wî jê dikin û serî dişîninXorasan; li gund û bajaran diğerinin (838). Di heman salé de Mîr Cafer li Mûsil serî hilda û evv heta Ezerbeycanê belav bû û di sala 839 an de jî têk çû.(125_94) Du salan şunde arteşa Ereban, Mazyarê agirperest jî li Teberistanê têk birin û ew jî wek Babek kuştin. Tê gotin, ku Xelîfe Mûtasim, bi zorê bi keça Babek re raketiye, Mazyar û patrik Emûriyye ya biçûke ku esîr ketî gotiye "Padîşah wisa dibêje!"(41) Di sala 846 an de Kurd li Esfehanê rabûn serpiya. Di sala 875 an de bi peşengiva Mehmed Hezar Merd serhildan û heta 878 an ve domkir. Di sala 906 an de êla Hezbaniyan rabû û heta Mûsil hatin lê têk çûn û vegerîn Ezerbeycanê.*10137î Wek tê dîtin bi dehan serhildan û alozî pêk hatine. Wekî pir caran jî mirov rast tê, kesên ji dagirkeran re alîkar dibin yan jî dibin maşika wan, di dawiyê de ji §ûrê dijmin xwe rizgar nakin. Yan bi suîkastan dikûjin yan jî di serhildanan de.

Sê salan piştî şere Babek û Afşîn, vê carê maşikê Ereban Afşîn serê xwe hilda, lê têk çû û di sala 841 an de mir. Gor jêderên Ereban; di malê de pût hatine dîtin û wî xvvestiye ku desthilatdariya Şahd Iranê dîsa bide jiyîn. Dîroknas hemû di vê baweriyê de ne, ku eger Mûtasim, Babek û Mazyar têk nebira û Bîzans feth nekira Islam dikete tehlûkeyeke mezin û belkî ji hoiê jî rabûya. Xûrremî, ji mirina Babek 99 salan şunve jî li Qerecê hebûn. Heta sala 1135 an li bakûrê Çemê Arasé (Mûxan) dijiyan.

Di dema xelîfetiya Reşîd de, Ereb bûn hakimê herêmê. Kelhe û set çêkirin û arteşeka gelek mezin li wir bi cîh kirin. Wek tê zanîn Xelîfe Harûn bû ku Kurd ji Xorasan, Mazenderan, Secsecîstan û Ezerbeycan rakirin û ji Samsun heta Edenê bi cîh kiribûn, Ew dixwestin Kurdan di navbera Bîzans û Misilmanan de bikin mertal an herêma tampon.

Sem'anî îddea dike ku Xûrremî ji salé carekê li cîhekî bi mêr û jinan ve kom dibin û pile çirayê dikin. Herkes ji xwe re jinekê digire.(41)

Ji wan yek reviya Hindistan.(13'235) Wek ku ew jêderana radigihînin tu têkiliya Ismaîltiyê bi îmaman re nine û ew berdewamiya Zerdeştî ye. Yanî di cewher de felsefa Zerdeştî ye, lê mümküne di şikil de hinek nermbûn kiribin ku ji erîşen Ereban rizgar bibin. Vê yekê Bîlgîn wiha tîne ziman: Mezheba Îsmaîlî jî heye ku wê; Zarathuştra bi Islamê porkiriyê/nixumandiye û di nav Kurdan de cîh nedîtiye/71'53' Di nava hinek Kurdan de, demekê dh girtiye, lê bawer dikim ne demeke dirêj e. Milekî Ismaîliyê jî Zikrîtiye. Pirtûkeka wan a taybet heye; di nimêj û duavên xwe de navê Hz. Muhammed avêtinê û tenê Qiyama Mêhdî tînin ziman. Di nav Kürden Xorasan û Anatoliya Navîn de bere gelek kesan xwe dabû hêviya Mêhdî; ku ewê were û dinyayê rizgar bike...Di rojên taybet de ayîna zikrê dikin. Belûdstan-Torbete Kiç-Çiyayê Mûrat navenda wan e. Li Belûdstanê ji wan re Zirkî yan jî Daî tê gotin. Beşek jî li Qeraçiyê dijîn.(95o8) Bi van agahiyan mesele hîn ba^ştir dibe; Zirkî/Zerikî, navê êleka Kurde ku li gelek dhên Kurdistan, Anadol û Xorasanê dijîne. Milê Ismaîliyê yê tê qalkirin Zerikî ne. Yanê di nava federasyon/ konfederasyona Kurdên Ismaîlî de milek jî Zerikî bûn. Ji navê Zerikiyan ew wek milekî tê nîşandin, lê ew milê federasyonê ye.

Zerikiyên li Qoçgiriyê di Cemê de lokme belav dikin

Li Iran, Iraq û Sûriyê ji alîgiiên Ismaîliyan re "Karmat" digotin. Şîiyân Kurdistanê jî di bin wî navî de bi veşartî xwe bi rêxistin dikirin. Di nav zanaatkaran de, ji nîve sedsala IX an şûnde xuya dike. Karmat li Sûriyê bi hêz bûn: bi taybet jî li Şam, Homs, Hama yê. Ev rêxistina ji alî meşhûr belavkar Yahya îbn Zikrazayh dihate birêvebirin/3'54* Belavbûna

Zerikiyan ya li Sûriyê jî eger inirov li ber çavan bigire, têkiliya Zerikiyan bi Ismaîliyan ve hîn zêdetir

derdikeve hole. Ji mirina Yahya hi şûnde birayê wî Sahib Aş Şamiya hate rêvebiriyê. Rêvebirekî Kurd li Sûriyê bi Zikrazayh ve têkiliya xwe hebû. Navê wî Cafer îbn Hamîd Al Kurdî bû. Belga dîrokî di sala 902-903 an de ji alî Sahib Aş Şamiya ve, ji hevalê wî yê Kurd re tê şandin. Cafer Al Kurdî îhtimaleka mezine ku rêvebirê bajarê Homs bû. Mektûb wiha ye: " Cafer Kurdî re silav. Ewên ku serî hildidin û bi Xw'edê û Eêxember bawer nakin li herêma te ne. Ji bo wê em arteşe dişinin wir...." Ev nameya jî îspat dike ku Kurd wê demê jî li wir hebûne.(V54)

Di gelek nivîsan de Îsmaîlî ji Batiniyan dihatin hesibandin û dîsa ji Xûrremîyan re jî Batinî digotin. Ibn-Don Hesen Razî dibêje: "Ji Ismaîliyan re; Batiniyye, Qeremita, Xûrremîye, Sab'iyye, Babekiyye û Mûhemmire digotin". Batinî, tê wata kesen ku fikra xwe nikarin eşkere bejin û di paş perde de dibêjine. Tê zanîn ku ew du beş in: Yek Cavîdaniyye, ya din jî Babekî ne. Cavîd serokê berê bû û paşe Babek îddea kir ku ruhê Cavîd derbasî wî bûye. Ew dijminê Ereb û ola wan bûn. Hema hema bi temamî tevgerên li dijî îslamê yê derdiketî re navê Ismaîlîtiyê lê datanîn. Bi dîtina min ti têkiliya Ismaîlîtiyê û tevgerên din bi îmaman re tune. Mumkune ku navê Îsmaîlê Caferî Sadik ji bo ku xwe pê kamûfle bikin bikar anîbin. Yan jî hinek nivîskaran û îdeologan bi zanîstî ew giredana îddea kirin ku bi îslamê re ware girêdan. Di bingeh de herdû jî dijber û dijminên hev in.

Îsmaîlî di sedsala X an de di nava dewleta misilmanan de bûn sedema gelek aloziyan. Ew, di nav dewleta Kurd ya bi navê Hamdaniyan de gelek propaganda dikirin ku ew terîqeta belav bibe. Li dijî zilm û zordariya Ereban, dixwestin hemwelatiyên wan hemû bi azadî olên xwe pîroz bikin; alîkariya feqîran bê kirin û erd li gelé belav bibe; di rêvebirina dewdetê de demokrasi û nava mirovan de jî wekhevî dixwestin. Hesen Sabah di

nava dewleta Ziyar de, êlên Kurd bi vê terîqetê birêxistin kirin û di demeka kin de alîgirên xwe gihîştin 60 hezaran.1101-44*

4- Bektaşî:

Ji navê Hecî Bektaşî Welî tê. Wek tê zanîn Welî ji Xorasanê hate navenda Anadolê. Îhtîmaleka pir mezine ku ew Kurdekî di baweriya Zerdeştî de bû, ji ber ûrîşûn Ereban hate Anadolê û li wir veşartî kar dikir. Li ser bingehê wî avête serhildana Baba îsheq pêk hat. Ew serhildana ji alî kalên Kurdên îro li Anatolî ye û Xorasanê ve pêk hatibû; li ser vê esasê mirov dikare bibêje ku nijada ku herdû rêber jê hatine Kurdên îro li dervayê welat in. E. Gezîk dibêje: Ew, kurê siltanê Xorasan Îbrahîm bû, koka xwe digihîşte îmamê heftan Mûsa Kazim. Kengê ji dayik bûye nayê zanîn, lê di sala 1270 an de çû ser dilovaniya xwe. Ji Xorasan hate Anatolî ye û bi veşartî kar kir. Îhtîmaleke mezine, ku ew ji mîstîzma koka xwe digihîşte Xorasanê ku wê demê li Anatoliya hebû û ji derwûşû qelender Ebu'l Vefa bû.(60) Piraniya wan rêberên asî bi îmaman ve tên girêdan, lê ti bingehekî vê yê rast nîne.

Şerîf Firat dibêje: Di sala 680 an de ji Nîşabûr derdikeve û cîhên ku lê diğere terîqeta xwe belav dike. Di bin bandora wî de gelek Irir û hezkiriyê xwe ji Xorasanê hatin Anatoliya Navîn û ji padîşahen Osmaniyan mîna Siltan Murat û Orhan jî alîkarî wergirt.(127'5ü)

Di dema îro de Hecî Bektaşî Welî ji alî sîstema Tirk ve bi dawetên mezin tê pîroz kirin; ew cejn ne li gorî felsefa Welî ne, hundurê wê valakirine û wek kevneşopiya Elewî û Kurdan asîmîle bike bikar tînin. Di rastiyê de berovajiyê vê ye; ew ji Kürden Zerdeştiye, ku ji ber zilma Ereban ya li navenda Xorasanê reviyan Anatoliya Navîn in. Mumkune Bîzansan jî hinek soz dabin ewana. Li Anatolî ye jî li hember Osmaniyan serhildan û tekoşîn dane, lê mixabin di dawiyê de hinek ji wan heliyane û hundurê felsefa wî camêrî jî vala kirine.

5- Ehl-î Heq:

Baweriya Kurdên Goran e. Di navbera vê û baweriya Dêrsîmê de jî paralêliyek heye û nêzîkî hev in. Him ji alî baweriyê ve û him jî ji alî rêxistina olî ve wek hev in. Têkiliya xwe ya dîrokî hene? Trowbridge, qala va têkiliya dike. Dêrsîmî xwe wek "Ewladê hèq" tarif dikin. Xûrremît-ên ku di sedsala VIII û IX an de li Zagrosên navîn bi bandor û baweriya şîa û Mazdakî diparastin, bi Zaza û Goranan ve wekheviya xwe heye. Herî zêde di serhildana Babekê dawî ya di salên 816-838 an pêk hatî de, ew gruba hate nasin. Wekhevî, parkirina erdê dixwestin û di nav gundî û zenetkaran de gelek aligirên xwe hebûn. Navê Xoremit-an jî di wata jina Mazdak Xorem de tê bikar anîn, yan jî wiha tê texmîn kirin. Di navbera Zazayên Bîngol û Palû yê de Xûrem tê wata xakê. Ji serhildana Babek şûnde, evên ku ji qetliyamê rizgar bûbûn reviyan aliyê Bîzansan. Jêderên Sûriyê jî radigihînin, ku di sala 820 an de li rojhilatê Diclê gelek aligirên Xûrremîtiyan yen çalak hebûne. Di nav herêmên ku Xûrremîtiyan serhildan kirî de navê "Zaza-yn" jî derbas dibe.(6ü)

6- Tevgera îsheqê Tirk (755):

Ev jî hevalê Eba bû û bawer dikir ku ew nemiriye û îddea dikir ku ew Pêxemberê ku ji alî Zerdeşt ve hatiye şandin e. Bi xwe ne Tirke, Zerdeştiye, lê ji bo ku li nav Tirkan xebat kiriye ev nava lê danîne.

7- Tevgera El Mûqanna (786):

20 sal ji mirina Eba şunda serî hilda. Dîrokzanê Ereb ji bo wan dibêjin "Ewên bi kincên Spî" Wê demê aie wan Spî hebûn û gundiyên ku ji wan re "Xelkê Reş" dihate gotin ji alî axa û birêvebirê Ereban ve dihatin perçikandin û Mûqanna çû ser wan.

8- Tevgera Ûstadsîs:

Xelk ji baca dewletê nerazî bû û ji xelîfê re nameyek şandin. M. Bin Saîdê ji Bexdayê hatibû bi mana 'xelk ji dîn derketiye' gelek komkujî pêk anîn. Di

sala 767 an de Ûstadsîs li alî Herat û herêmên din 300 hezar kes kom kir û dest bi şer kir. Di şer de têk çû û hate darvekirin. Ûstadsîs xwe wek Fêxemberêkî dizanî. Di şer de 14 hezar dîl hatin girtin. Ûstadsîs, şandin Bexda û li wir di sala 768 an de kuştin.(105'165)

9- Sûnbaz:

Dema xebera kıştina Eba Muslim gihîşt Xorasan, di nava du mehan de Sûnbaz serhildana xwe destpêkir. Islam hîn jî di mêjiyê gelé de rûneniştibû; hêviya ol û împaratoriya berê zindî bû.]i bo wê du sozan da, Yek: Xelîfeta Ereb ji holê rakin û Imparatoriya Sasanî ava bikin, duyem jî: qîbla misil manan Ka'bê hihveşînin û rojê dîsa bikin qîble.(105"131> Ew tevgera ji alî olî, civakî û cografîk ve gelek nêzîkî Kurda ye. Heta vir me qala olî kir, birêz Zorlû di alî erdnîgarî ve jî wan tarît dike ku herêmên Saka û Kurdênîro li dervayê welatbelav bûyine: Di sala 755 an de, li bajarê Nîşapûr a Xorasanê serî hilda, ew wek bombeyekê kete paytextê Ebbasiyan. Eewra Sûnbaz bajarên girîng ên wek Nîşapûr, Rê, Kûmîs, Esfehan û herêma Mevaraûnnehir kiribûn bin destên xwe. Tişte din ê balkûş jî Sûnbaz îlan kir ku ew vegeriyane ser dînê xwe yê kevn, Mecûsî/Zerdeştî. Ji gelé herêmê eleqeyeke mezin dîtiye, ku di du mehan de 90 hezar kes li dora xwe kom kir. Mansûr bi xetera mezin a dîn re rû bi rû bû. Ji bo wê serhildanê serleşkere mezin Cehwer şand. Şer li Cercanban pêk hat û 60.000 aligirên Sûn¬baz mirin. Xenîmetên bi destketin Cehwer li askerên xwe belav kir û bi ser wê de Xelîfe jê re dujminatî kir û paşû jî kuştin.(lü5'9fi)

10- Serhildana Karîniyan:

Biryargeha xwe Teberistan bû. Di bin serokatiya Mazyar bîn Karin de li sala 839 an de destpêkir.

11- Serhildana Karmatî:

Ji Basra û KCife derket. Paşe dibin serokatiya Hesen bîn Sabah de derkete asta herî bilind. Navenda xwe çiyayê Elbruz û Qazwîn bû. Ji wan re Batiniyê Ismaîlî dihate gotin û gelek zirar dane Selçûqiyên sunnî. Ji mezheba Şafî bûn û Henefî biçûk didîtin. Nîzam ûl Mulkê dijminê Ismaîliyan ji alî wan ve hate kuştin û dijminatiya Tirkan di nav wan de gelek kûr bû. Di keleha Alamût a bi nav û deng de rûdiniştû tenê şoreş îxrac dikir. Keleh paşe ji alî Moxolon ve bi erdê re hate kavil kirin.

Wekî hinek serhildanên me ragihand bi dehan raperîn li hember şowenîzma Ereb û zordariya wan pêk hatin. Di cewherê wan de, bi piranî Kurdên îro li dervayê welat û ola Zerdeştî hebû. Hersa vî xelkî li dijî îslamê rabû û bi kuştina Eba Muslimê Xorasanî re bilind bû, bi sedan salan şer kirin ku heta ji taqetê ketin û piştre jî li Qefqasya, Anadol, Sûriyê û rojavayê Ku rdistanê belav bûn. Ewên ku belav bûn jî dîroknûsan bi taybet jî yen Tirkan navê Tirkmen/Oxûz li wan danîn.

TIRKMEN-OXÛZ

Heta roja îro dema qala Tirkmenan dihate kirin me digot ew Tirk in, vê dîtine di mêjiyê mirovan de weqas bi hêz cîh girtiye ku gelek qare/zahmete bê guhartin. Min li ser gelek pirtûk, meqale û nivîsan de lêkolîn kir û xwest, ku rastî ber eqsê vê yekê bêm, lê mixabin. Lêkolîner, dîroknûs, nivîskarên Kurd, yen biyanî û bê guman yen Tirk jî vê yekê dinivîsîn. Kesekî bi kûrayî û berfirehî li ser lêkolîn kirî û serê xwe ê§andî min nedît. Gelo ew gotina Tirkmen (di wata Tirkan de), term û wata wê raste? Ji bo ku mirov ber eqsê wê îddea bike û bersiva vê yekê dayîn di §ertên ez tê de me ne hêsan e.

Di dîrokê de gelek derbe li Kurdan ketin, ji wan derbeyên mezin ku li mêjiyên Kurdan ketî yek jî êrî§ên misilmanan bûn. Ji bo ku Kurd xwedî ola Zerdeştî bûn, rastî komkujî û bêwijdaniya Ereb û misilmanan hatin. Di pêvajoya belavbûna îslamê de, Kurdên ku ew ola nû pejirandin li welatê xwe man; yên qebûl nekirin jî berbi çiyan hilkişîn. Bi taybetî jî çûn Xorasan û Asya Navîn. Heta vir me hewl da vê hovitiyê nîşan bidin. Ew ditin ji alî mamoste birêz C. Bender wiha tê nivîsîn: Ew şera ji rûbarê Dicle bigire heta Amû Derya belav bû. Li başûre Gola Kesk, mîrîtiya dawî ya Zerdeştî jî, di dema Eba Muslim de, di sala 750 an de ji alî Emewivan ve hate rûxandin û ji holê rabû. Dîrokzan Dîrîver dibêje: Ji Herranê heta Bedlîsê, li her kutekekî sê Kurdên ku misilmantî qebûl nekirine li darxistin.(12398) Di serdema îslam li Asya belav bûnê de, artê§a misilmanan li sînorên Medan pir giran pâşve diçû; lê sînorên ku Faris lê dijî zêde ew hêsantir dibû. Ji ber wan êrîşên bê dawî, beşekî Kurd ji Xorasanê jî derketin. Piştî têkçûna Eba Muslimê Xorasanî li Kurdistanê zorderiyeke bê hed û hudût pêk hat û gelé ji neçarî barkir Asya Navîn, Çîn û Hindîstanê.(52) Yanê, ji ber hatina Tirkan a Kurdistanê, Anadol û Rojhilata Navîn, Kurd heta nava Asya belav bûbûn. Piştî vê tespîtê em dikarin êdî li wata Tirkmen bigerin:

Nav lêkirina Tirkmen:

Di dîrokê de, bi taybetî jî di dîroka Tirkan de carna qala Oxûzan û carna jî qala Tirkmenan derbas dibe. Ew herdû nav du miletan tînin bîra mirovan. U Tirk, Oxûzan wek hîmê nijada xwe dizanin. Lê di bingeh de Oxûz û Tirkmen jî yek in. Ji Oxûzên misilmantî li Mavverûnehîr qebûl kirî re Tirkmen dihate gotin, ku bi vî navî ji Tirkmenên ne misilman dihatin cûdakirin. Ew cûdabûn gelek girînge; eger lêkolîner wê baş analîz bikin dikarin dîroka heta roja îro bê guhartin. Ew cûdabûn di nava Kurdên wêderê de bû sedema belavbûn, dijminatî û navên cûda... Navê Tirkmen ji Turk+man (manend) tê.(I31’79) Ew tê wata ku Kurdên wek Tirkan man

yan jî ya herî nêzîkî rastiyê ewe ku Kurdên di bin desthilatdariya Tirkan de mane tarît dike. Di belgeyên Osmaniyan yên fermî de Tirkmen bi Kurdan ve di heman watê de ye.(49) Em bi mînakekê destpê bikin: Di fermaneka Osmanî de qala Kurdên Kiliçli tê kirin, dîsa di fermaneka

din ê bi wan re eleqedar de dibêje: ji taîfê Tirkmenên Kiliçli<8913,yanê hem Kurd hem jîTirkmen...Dîsa ...civata Turkmen ku 36 cemaate. Di nava wan de ekrad Kiliçli va girêdayî Asaf Kethüda jî hebû.(8913) Di vir de jî, li sifatên din ekrad (-Kurd) jî lê zêde dibe. Yek ji Ideologen dîroka Tirkan Seferoglû vekirî dibêje: Di bingeh de Kurmanc û Turkmen yek e.(9127) Di lîteratûrê Osmaniyan de êl wek: "aşaîr", "taîfa koçer", "Tirkmen", "ekrat" û hwd bi navên giştî tên binav kirin.(129'33) Psellosê ku şere Melazgirtê nivîsandî, di qirnê xwe de peyva Kurd, Tirkmen û Oxûz wek hev dibîne û ji ber wê Alparslan him wek Part him jî wek Kurtos vasileûs (kralê Kurd) dibîne. Gor dîtina wî ya piştî salên hezarî jî Kurd, Tirkmen û Oxûz yek in. Yanê li van peyvana Oxûz jî zêde dibe. Bave Ziya Gokalp jî di sala 1884 an de dibêje: Ji gundiyên Elewî-Bektaşî re digotin Tirkmen; ew Kurd bûn. Digotin em ji Mûsilê hatin û ji Beraniyan in.{128_67) Ji Beraniyan re bi tirkî Qerekoyûnlu tê gotin. Heta roja îro me Qerckoyûnî wek Tirk dizanin, lê ne bi vî awayî ye; di beşa wan de emê bi firehî qal bikin. Wekî gelek jêderên cüda didin xuyakirin: Oxûz, Tirkmen, ekrad hemû Kurdan didin nişandan. Ji bo Tirkan yan jî yên nê Kurd peyva "Yoruk" bi kar tê.

Piştî Osmanî li rojavayê Anadolê bi hêz bûn û desthilatdariya wan dest-pêkir, ji Tirkmenên koçber-nîvkoçber re gotin "Yoruk", ew ji raderê (mesterê) yuru-mek-rêçûnê tê.<115 38) Di vê hevokê de jî rastiyeke din derdikeve holê: Bi desthilatdariya wan re înkar kirina Kurda ya peşî destpêdike û hewl didin ku Kurdan wek Yoruk nîşan bidin. Ya esasî ewe, ku ji Tirkên koçber re Yoruk tê gotin û ji Kurdên koçber re jî Tirkmen hatiye gotin. Vê dîtine Orhonlû jî di- pejirîne: Li Anadolê navê yoruk

mefûmeka etnîkî îfade dike.(90 ,05) Yanê etnîsîta Yoruk û ya Tirkmanan jihev cûda tê dest nîşankirin. Di "Kanûnnamê" de tê gotin ku Yoruk gelé koçer in. Ew di şer de her tim li paş bûn, top dikişandin, diwarên kelehê avadikirin, kereste dikişandin û hwd.(1611) Devvleta Osmanî bi zanabûn Yoruk li paş eniya şer bi kar dianîn ku bila kêm zirarê bibînin û Tirkmenên Kurd jî li peş dajotin ser dijminên xwe. C. Tirkmen jî vê dipêjirîne: Yoruk, di arteşa Osmaniyan de hertim di xizmetê paşiye de bûn.(160S21)

Cevdet Turkay, yek ji bave dîroka Tirka ye, ku di arşîvbn dewletê de lêkolîn kiriye û ji wan kîtabeka qalind derxistiyê û di vê de ji 7000 zêdetir, êl û koman tespît kirine. Di pirtûka xwe de wiha dinivîse: Di belgeyên kevn de niqteyekê bala min kişand, ku ew jî bîwêja: Tirkmen ekradî-Kurd û ekrad- Kurd Tirkmanî bû (Hûccet-î zahriyye, D-BŞM-1144 ve Mûhîmme Defterî no 124, Rûpel 24) gor dîtina me, peyva li vir wek Tirkmen û ekrad bikar hatî di heman watê de ye. Yane, Tirkman jî ekrad jî tê mana Tirkên Oxûz. Navê Tirkên Oxûz "TIRKMEN" e ku di dîrokê de cîh girtiye. Peyva "KURD" jî tirkî ye û tê wata "Aşût".(1601) Nivîskar li vir xwe eşkere dike û rastiyê dinivîsîne. Lê, li ser nerastiyê jî dîroka Tirkan dihûne... Heman nivîskar dibêje: Mirov dikare bêje raste, ku kokê wan hemû koman Tirk qebûl bike. Di aliyê din de bi gelek navên rnîna; Kurd, Kurdî, Kurdlû, Kürdiler, Kurdîkanli, Kurd Mihmatlû, Qere Kurd... Kurdcû, Qaracakurd û hwd jî di belgeyan de hene. Ji bona van

hemûyan: Tirkman ekradî, nîştecîh-koçer Tirkmanî û Tirkmen taîfesî tê gotin. Wekî bê dîtin jî êla Kurd, Kurdî, Kurtler yan jîbi navê kî din; Mûrtana li Çanqirî, Edene, Teke (Antalya) û Mersînê bi cîh bûn û ew ji Yoruk û Kurdên Tirkmen in. Dîsa civata bi navê QereKurd, QaracaKurd jî li Qeyserî, Sêwas, Nevşehir, Edenê, Sarihan-Manîsa bi cîh bûn û wek nîştecîh-koçer Bozûlûs Tirkmenî derbas dibe. Yane, êla navê xwe Kurd û Kurmanc jî Tirkmen e.(,60'15) F. Sumer dibêje: Oxûzan navê xwe zû bi zû ji bîrnekirin;

ji sedsala XIII an bi şûnde, êdî navê Tirkmen bikaranîn.(131127) Ew jî tê vê watê, Kurdan heta vê sedsalê navên xwe yên êlî û zendiyê bikar anîne. Piştî sedsala tê qal kirin jî êdî şere Moxolan destpê dikin û di van tevlîheviyan de nav hatine guhartin. Bi dîtina min divê nav guhartin bi desthilatdariya Osmaniyan ve destpê bike. Lewra Osmaniyan ew nava lê danîne... Bi dehan belge û jêder diyar dikin, ku Tirkmen û Oxûz, Kurd bi xwe ne; eger pêwîst be, hîn zêde jî mînak tên dayîn.

Iro, li Tirkiyê hinek komên mirovan wek Tirkmen tên binav kirin. Ew bi tirkî diaxifin û xwe wek Tirk dizanin. Ew gelek belav dijîn. Lê di alî laşî de ew wek Moxolan in. Bi dîtina min, ew, komên ji Moxolan mane. Tu têkiliya wan bi Kurda re, yan jî Kurdên wek Tirkmen tenê binavkirin re nîne. Di pirtûka C. Turkay ya min li jor qal kirî de jî ew tê xuyakirin. Ji heft hezar êlên hatine nivîsîn beşekî pir hindik jî wek Moxol-tatar-Qeretatar derbas dibe. Tirkmenên (xwe Tirk dizanî) îro li Tirkiyê ew Moxolanan e.

Di nivîsên Osmanî de peyvên mîna "Etrak" û "Ekrad" jî derbas dibin; Doç Yilmazçelîk dibêje: Bi wan peyvan, yên nîştevan û koçber tên nîşan kirin. Wek mînak: dema dibêje " Bozûlûs Tirkmenî" tê wata: Bozûlûsê nîştevan; dema "Bozûlûs Ekradî" tê gotin jî tê wata: Bozûlûsê koçber.(H6-S) Hinek dîroknûsên Tirk jî hewl didin rastiyê veşûrin û dikevin nav lîstika peyvan. Wek doç. Taşdemîr dibêjî: Di belgeyên Osmanî de peyva Ekrad di wata koçber û Yorukan de bikar hatiye; dîsa Etrak jî di heman watê da ye.(109 105) Di vir de hertiştekî bi zanistî tevlîhev dike û mêjiyê mirovan lihev dixe; bê guman ew jî rêya asîmîle kirinê ye. Berî hertiştî Yoruk bi Tirkmenan ve di heman watê de nayên bikar anîn. Min li jor mînakên wan dan. Ekrad, di zimanê Erebî de di wata Kurdan de ye, di lîteratûra Osmaniyan de jî bi kar tê. Bi kurtî peyvên ekrad û etrak e; ji bo ku Kurdên nîştecîh û yên koçer jihev bidin cûdakirin bikar hatiye. Lê dîtinen Taşdemîr ên di derbarê nav lêkirinê de jî rast in: Dema nav li Tirkmenan

kirin ew sîstema bikar hat: El ji kijan cîhî hatiye xerê, navê Mîrê yî wêdenê lê dihate kirin. Wek mînak: Di belgeyan de êla wek Bozûlûs derbas dibe ji bo Kethüda (walî) Izzeddîn Bey wek civata Îzzeddînlî hatiye nivîsîn. Ji wê komê hinekan ji bo ku tîr çêdikirin ji wan re gotine "Taîfeî Ekradî Okçû Izzeddînlî " yan jî wek ekradî Tirkmen hatiye bi nav kirin. Wek vê ye, êlên di eslê xwe de mîna Kabaîl-î Rişvan yan jî Ekradî Rişvan dihatine nasîn û ji Helebê heta Qastamonûyê diçûn zozanan û wek êlên Tirkmen ekradî hatine nivîsîn.<1(W ,05) Li destpêkê, navê serokên élan wek nav lê dihat danîn, lê paşâ hate guhartin û bi navê cîhên ku lê dijîn êl hatin bi nav kirin.(90 105) Ew jî balkâşe

û sedema wê ewe, ku navê Kurdan di dîrokê de wenda kirine. Wek mînak: Elên girêdayî Reşiyan piranî bi navê serokan tên xwendin: Xel-ikan, Sef-ikan, Naşir, Bil-ika, Şex-ika û hwd. Lê pişt re navê Tirkmenên Helebê li wan danîne ku bi temamı tevlîhev kirine.

Li ser fîzîk, jiyan û kevneşopiyen Turkmen Q Kurdan de jî dîtinen balkê§ hene. Ew ji îspateka berbiçave, ku herdû peyv jî (yen din jî) Kurdên li dervayê Kurdistanê nîşan didin. Li ser vê Seferoglû wiha dinivîse: Di alî din de Kurmancên ku wek beşek ji Kurdan tên qebûl kirin bi Tirkmenan ve, bi pir aliyên xwe (fizik antropoloji jî di navê de) ve bi qasî ji hev nayên veqetandin dişibînin hevûdû, ew rastiyeke.<9,'5) Gerokê Tirk Evliya Çelebî jî dibêje fîzîkê Kurdan bi yen Tirkmenan ve yeke. Laş, jiyan, kar, aşxan û konên Tirkmenan bi yen Kurdan ve wek hev in.(91'59) Baldar bin ku herdû dîtin jî dibêjin Kurd û Tirkmen yek in!

Nav lêkirina Oxûz:

Wekî me li jor jî gote, nûser û îdeologên dîroka Tirk yen fêrmî îddea dikin, ku Oxûz bi Tirkmenan ve Tirk in û ew koka miletê Tirk in. Ew yeka ji alî gelek nûser û lêkoiîner ve jî tê pejirandin. Ji dîroknûsên Tirk me gelek mînak dan ku ew ti cûdahiyê nakine navbera Tirkmen, Oxûz û Kurdan;

yan jî wek ekrad d ibînin. Lê dîsa jî ew di nav hewldanekê de ne, ku vê yekê veşerin û wek koka Tirkan nîşan bidin. Hinek nîv veşartî hinek jî temamî bi înkarê nêzîkî me¬sele dibin. Di vê beşê de jî emê hewl û nîşan bidin, ku ka Oxûz kî ne û bi rastî jî ew ji nijada Tirka nin an na?

Di pirtûka bi navê "Dîvani Lûgatî Tirk" de rastiyek wiha tê eşkere kirin: Bi peyva "Tat", Faris tên dest nîşan kirin, bi peyva Tawgaç jî Tirk tên îma kirin. Mangişlax: Di welatê Oxûz de cîheke.(134 454) Di vir de vekirî tê xuyakirin ku Tirkên berê wek Tawgaç dihatine binav kirin yan jî naskirin. Peyva "Tirk" bixwe jî ji alî Çînî yan ve li Tirkan wek nav hatiye danîn, hinek milet yan jî dewlet ji derveyê vê tên bi navkirin. Navê Tirkiyê jî; bi avakirina Osmaniyan re Venedîkiyan li wê welatî danîne.(1S6'8) Ihtîmaleka mezine ku Tirkan navê Tawgaç li xwe dikirin.

J. Marqûart îddea dike ku peyva Oxûz ji Ok (tîr) + ûz (zilam) a tirkî hatiye, lê di tirkî de peyva di wata zilam de ûz nîne. Zanyarê Macar J. Nemeth jî îddea dike; ku Oxûz ji ok+z pêk hatiye; Ok= oymak/êl e û z jî piraniyê îşaret dike. Lê di Kîtabên Orhûn de ji bo komên siyasî û qewmî peyva "bûdûn" bikar tê.(131‘8) Wekî xuya dike di nava zanyaran de li ser navê Oxûz konsesûsek nîne. Hinek jî dibêjin ji "dokûz-neh" a tirkî weguhuziye ser Oxûz, eger ew dîtin rast be, wê deine federasyoneka Kurd ji neh (dokuzê) élan pêk dihatî li herêma Qefqasya û bakûrê Derya Kesk û Asya dijî hebû ku nav ji wir derket hole...

Tê gotin ku cara yekemîn navê Oxûz di kevirên Yenîsey (sedsala VI) de hatiye dîtin.(l4892) Me di beşa Macar û Kurdan de qala wan kiribû ku ew Kurd

in û li vir jî ew yeka te pejirandin. Di vê nivîsa Yenîseyê de kral dibêje "êlên min neh in". Bê guman ew xelekeka girînge û nîşana wê ye ku Kurd zû çûne wir. Bi rû vê de Seferoglû yê ku li ser koka Kurdan dinivîse û hewl dide wek Tirk îspat bike niqteyeka baldar destnîşan dike: Kurd, berî

Islamê girêdayî hakan ê Turkîstanê yê mezin Içoxûz-Xan bûn. Di navbera salên 622-32 an de Oxûz-Xan İslamiyet qebûl kirin û çûn vê yekê ji Hz. Muhammed re bibêjin. Navê elçiyê wan Boxdûz-Aman Beg bû. Ew begekî Kurd ê girêdayî Uçokan bû.<91-58>

Di Dîwanî Lugatî Tirk de êlên Oxûz

Mixabin îdeologên dîroka Tirk ji bo ku bi teref û User inkara Kurdan dîtinen xwe dinivîsin, ji bo vê em bi şik nêzîkî dîtine wî dibin, le di nava wan de rastiyan jî mirov dibine. Ditina wî ya ku Kurd girêdayî Hakanê Turkîstanê bûn de em bi guman in; misilmantî qebûl kirina Oxûzan ya wê demê jî bi min zêde logîk nayê, lê navê serokê Kurd bi min balkê§ hat. Boxdûz-Aman, eger mirov 'b' ya pê§î bavêje, ewê bibe oxdûz ku gelek nêzîkî peyva Oxûz e. Ne îhtîmaleke dûre, ku navê Oxûz ji vir jî hatibe. Lewra ew hevdîtina serok êla Kurd bi Hz. Muhammed ve navdare û gelek jêder qal dikin. Ew navê begê Kurd bi guhartineka biçûk wek Oxûz kete termînolojiyê. Dîtineke cüda jî ji alî Kara ve tê îddea kirin: Oxûz milê Tirkan yê herî zêde bi serhêjmar û yê di dîrokê

de rola herî gîrîng lîstî ne. Di sedsala X an de İslamiyet qebûl kirin. Ji ber wê: di wata Tirkên misilman de, navê Tirkmen lê danîn.(148‘92) Li vir jî te îddea kirin ku di sedsala X an de Oxûzan misilmantiyê pejirandine û îhtîmaleke derdixe holê. Ew jî parçebûna Oxûzan ya di alî olî de ye. Yanê Oxûz-Kurdên li derva yen ku hê jî nebûne misilman wê demê beşekî İslamiyet qebûl kirine. Her çiqas gelek nîqaş li ser hebin jî, Tirkan di ber Kurdan İslamiyet pejirandin û bi vê yekê dixwestin ji hêza ola Islamê sud werbigirin. Kurdên sedsala X an, misilmantî qebûl kirinî jî di wata Kurdên wek Tirkan bûne de navê Tirkmen- Oxûz lê hate dayîn. Li ser wê di beşen pê§ de jî emê bisekinin.Di dîtina Kara de niqta din a girîng jî ewe, ku berî Islamê qebûl kirina navekî din ê Oxûzan e.

Kara îddea dike ku Oxûz, di salên 600 an de li dora çemê Selenga û girêdayî dewleta Gokturk dijîn. Di sala 630 de dewlet hilweşi\ra û Oxûz ketin bin destên Uygûran. Di dema Gokturkan de bi serokên wan re lihev nedikirin. Ji bo ku qewmeke cûda û xwedî dîrokeka siyasî ya cûda bûn li herüber Uygûran bi Çîniyan re diketin îttîfaqê.(14S'92) Di gotina qewmeka cûda de mebesta wî ne şaxe Tirkan e, mebesta wî Kurd in, lê nikare vê yekê eşkere bike. Di sala 750 an de Oxûzan serî hildan û Kirgizan jî alîkariya wan kir. Piştî vê di nivîsan de Oxûzên neh (dokûz Oxûz) derbas dibin, lewra ji 9 élan pêk dihatin. Paşe koçî rojava, navbera Aral û Xezer kirin û li wir dewleta Oxûz-Yangû avakirin. Ew dewleta di sala 1000 an de hilvveşiya. Hatin bakûrê Derya Reş, ji wir jî grûbek çû Balkanan. Bîzansiyan ji wan re gotin "Uz" û Ereban jî "Gûz" digotin. Piştre ketin artêça Bîzans, lê di çerê li sala 1071 an de derbasî alî Alpaslan bûn. Grûbek jî li Xorasan bi cîh bû.(,48 92) Ew rewş ji alî gelekan ve tê nivîsîn ku ji arteşa Bîzansan hinek derbasî alî Alparslan bûne. Ewên ku derbas bûne Kurd in, lewra birayên wan en li Xorasan, Qefqasya û Kurdistanê bi Alparslan re îttîfaq kiribûn, ji ber wê ew jî derbasî aliyê birayên xwe bûn û di şer de biserketin.

Pirtûka ku Tirkan dîroka xwe li ser helçinî/hunandî wekî tê zanîn "Dîvanû Lûgat-ît Tirk" e. Di dema nivîsîna wê de nakokî heye: Li cîhekî tê gotin ku di sala 1072-1073 an de hatiye nivîsîn; li cîhekî jî tê gotin ku ew di sala 1196 an de hatiye nivîsîn. Kesê nivîsiye navê xwe Mehmûd e; bavé wî jî Huseyn e, kalê xwe jî Mehmet bûye. Di cîhekî de jî dibêje bav û kalên me Türkistan ji Samanoxûllari girtin. Kaşgarli, herdem Oxûzan ji Tirkên din ve d i qetîne. (134'XIII) Ew veqetandin ji bo me îspateke, ku Oxûz ne Tirk bûn û ew Kurdên koçber, yan jî beşekî Saka bûn. Di cîhekî din de dibêje: "Ez li deşt û cîhên wan geriyam. Min ziman û qafiyên zimanê: Tirk, Tirkmen, Oxûz, Çixil, Yaxma, Kirgiz hîn kirin, nivîsandin.(134'4) Destnivîsa wê ji

cîldekî pêk tê. Yekî bi eslê xwe ji Savê- Iranê ew piştî 200 salan kişandiye vê nüsha di dest me de, ku niha ew kesa li Şarne rûdine... Ewê Iranî, îhtîmaleke ku Kurd e û pirtûkê wergerandiye tirkî. Mehmedê ji Şam6 hema hema tirkî nedizaniyê û erebî jî baş nedizaniye/134' XVI) Ji bo wê jî tê nivîsîn ku vvî bi tirkî baş nedizaniye. Lê orîjînala wê bi kijan zimanî bû? Bersiva wê jî dikare gelek deriyan veke... Osmaniyan tirkî ji bîr kirin; bi erebî dixwendin û bi farisî jî diaxifîn. Vana Tirk û tirkî ji bîr kirin.034'

xxxv) QiVg em bejin, ku Tirk: di peşxistin, hezm kirin û neqil kirina çandên heyî de zîrek in... Destanê Oxûzan yên mîna Oxûz Kaxan, Dede Korkût û Koroxlî ji alî Oxûzan ve hatin afirandin... Destana Alp-ertonga yan jî Afrasyap jî ya Kurda yê netewî ye...(91o6) Wekî tê xuyakirin gelek destanên Kurdan jî kirine malên xwe.

Dr. Gündüz ji Kaşgarli wiha radigihîne: "Navê Tirkmen, ji alî "Zulkarney" ve "Tirk-Manend (wek Tirkan) lê hatiye danîn. Lê di alema Islamê de, Tirkên ku misilmantî qebûl kirî re Tirk-manend tê gotin. Ebûl Gazî jî dibêje nav ji alî Farsan ve hate dayîn. Di sedsala XI an de ji Karlûk, Xalaç û Oxûzan re Tirkmen hate gotin. Kaşgarli dibêje Karlûk şaxekî Oxûzan e.(ll5"19) Belê ew pir girînge. Gor dîtina min ew navên Karlûk, Xalaç û Oxûz komên ji sê zaravên Kurdî diaxifin nîşan didin û hemû Kurd in. Dîtina Gazalî jî bi vî awî raste: Gor Kurd û Farisên li Medya nişteciîh, Kurdên li derva mayî, bi taybetî jî yên li alî Tûran/Tirkan manî re "Tirk-man" hate gotin. Lewra di Kurdî de "man" tê wata wek gelé wir yan jî wek Tirkan bûn/man. Di vir de Kurdên nişteciîh, ên ji yên derva mayî re bi qar ketine, gumanên xwe yên asîmîle bûyîna wan nîşan dane û bi hêrs dikevine ku çima ew jî nehatine Kurdistanê û wek Tirk mane... Li ser vê babetê Bîlgîn dibêje: Aryanan xaka Tirkmenîstana îro bi carekê re terk nekirin. Ewên hatin Iranê û bi cîh bûnî, ji yên ku natine re gotin "Tûr" û vaya bi Mît ekê xemilandin.(7,190) Ji alî din ve Oxûzan di sedsala XIII an de xwe wek

Tirkmen bi nav nedikirin, îhtîmaleke ku ew ji ferqa koçberî û nişstecîhî yê dihat.(115'20) Dîsa girînge ku vana heta sedsala XIII an navê Tirkmenî li xwe nedikirine. Lewra ew nava hinekên din li wan danîbû; wana navê xwe yên êlî û kurdî bi kar dianîn. Lê Kurd û Farisên

' J

nişstecîh û gel en cîran navê Tirkman li wan nan. Li vir nivîskar xwe dide dest ku Oxûzan xwe wek Tirkmen bi nav nedikiriye.

Gor Kaşgarli Mehmûd jî dinivîsîne Tirkmen, Oxûz in. Çîroka vê yekê wiha qal dike: Zulqerneyn ji Semerqentê derbas dibe û berbi welatê Tirkan çû. Tirkan, serdarekî (hakan) xwe yê bi navê Şû hebû û xwedî leşkerekî bi hêz û mezin bû. Keleha Şû yê nêzîkî Balasagûn jî wî avakiribû. Xeber dane Şû ku Zulqerneyn nêzîkî keleha wî dibe; fermana te çi ye em şer bikin an na? Zulqerneyn ji çemê Xoçant derbas dibe û tê meqerê Şû. Bi ser vê de Şû daholan lêdixe û berbi rojhilat diçe. Di nava gel de tevlîhevî çêdibe. Ewên ku ajal peyda kirine bi Hakan re çûn lê ewen ku neçûn 22 kes û zarokên wan bûn. Ew êlên Oxûzan in... Paşö du kesên din tên; westiyabûne û dibêjin Zulqerneyn rêwiyek e; li cîhekî nasekine. Ji wan re Kal-aç dibêjin; piştre dibêjin Xalaç. Zulqerneyn tê û dibîne ku porên wan dirêj in û belgeyên Tirkan li ba wan hebûne û ji bo ku dişibîne Tirkan ji wan re dibêje "Tirkmen-end". Tirkmen di eslê xwe de 24 zend in. Lê Xalaç jî du zend in, carna ji wan vediqetin û wek Oxûz nayên hesibandin.(135'4]6) Di vê çîrokê de jî mirov şopa Kurdan dibîne. Xalaçê ji dûr hatine jî zarava axifên Kurdan yê din in. Por û şik^ wan jî dide xuyakirin ku ew Ëzdî bûne, dibe ku vê demê Zerdeştî yan jî Ehlî-Haq bin jî. Heman jêder

îspateka din jî eşkere dike: Di navbera Tirkên Hakanli û Tirkên din de û di navbera Tirkmenên Oxûz û yên din de cûdahiyeke ziman ê heye, ku ew qaîdeka qet nayê guhartinê.113414* Li cîhekî dibêje di alfaba tirkî de 18, di cîhekî de dibêje 24 tîp hene..

Devvleta Osmanî di dema Meşrûtiyet -1908 hate ilan kirin bi şûn de, xwest "Alayên Hemîdiye" ji hole rake yan jî ji nû ve bi rêxistin bike. Ji bo vvê jî nav kirin "Alayên Aşîretan" demekê xwestin nav bikin "Alayên Oxûzan" lê paşû dev jê berdanV3'™ Bi dîtina min ew jî watedare ku neviyên Oxûzan bi navê kalên xwe yên kevn bên binavkirin.

Şaxân Oxûzan

jeder a li ser Oxûza yê heri kevn ji alî Kaşgarli Mehmûd ve hatiye nivîsîn; mümküne ku beri vê jî "Oxûzname" hebûne, levvra di gelek cîhan de nave wan derbas dibe, lê kesî rûyê wan nedîtiye. Ew dikarin ji gelek rastiyan re deri vekin. Kaşgarli Oxûzan dike du beş û ji wana Bayindiran wek bi kok, binât û navendî nîşan dide. Tddea dike: ku Melîkşahû Selçûqiyan ji êla Kinik e û xanedana Osmanî piştre bi Kinikan re bû xisim.fU4'68) Heman nivîskar wiha berdewam dike: Oxûz, zendeka Tirk e. Oxûz Tirkmen in. Vana 22 bir in; her zendekî belgeyeka xwe û damxeka xwe ya heywanan heye. Bi rêya wan hevdû nasdikin. Wana:

1. Kinik
2. Kayix (-Qeregeçî-182)
3. Bayûndûr
4. Twa (Yiwa)
5. Salgûr {-Qeregeçî-Ş.R li Milan mêzeke)
6. Afşar (-Qereman û Kurmanc in)
7. Begdîlî (-Canbeg)
8. Bûxdûz
9. Bavat

s

10. Yazgir (Beranî-Kocadax)

11. Eymûr
12. Qereboluk
13. Alkaboluk
14. Ixdir
15. Urexîr
16. Tûtirka
17. Ûlayûndlûx
18. Tûger
19. Beçenek
20. Çûvaldar
21. Çepnî
22. Çarûklûx.(134'58)

NAVÊN ZENDAN 1

NİŞAN

t KINIK

2 Kayix A-À

l - t*7

3 BAYINDIR j «ili L» g

4 ÎWA-YIWA liy lit ■—9

>1

5 Salxur j/àlad ES

6 AVŞAR -t

7 BEG-TÎLÎ

8 BÛXDÛZ J

9 BAYAT LJ irt

10 YAZXIR S//Z-

11 EYMUR

12 KARA-BOLUK aJi-ij i} n

13 ALKA-BOLUK au i

14 Ixdlr X'

15 Urexir-Yurexir //7ı1

16 TOTIRKA > VA

17 Ala-Yundlux Âi U 'i t

18 TOKER / * v\

19 BEÇENEK

20 ÇOVALDÛR y~ ZSx.

21 ÇEPNÎ rV

22 CARÛKLÛX 7«JLi .»•

Şaxen Oxuzan 13, 230

Mümküne niha ji hole rabûye, lê berê di nava Kurdên li Anatoliya Navîn de kevneşopiyek hebû, di gundekî de bi hezaran sewal û bi dehan keriyên pez, berx û bizinan hebûn. Ji bo ku bê zanîn ew ajela malê kê ye, her malekê nîşaneka wan hebû. Ev jî du cûre bûn: Yek, guhên miyan di cîhên cûda cûda de qilç dikirin û herkesi dizanî ew dûri û ajala kê ye. Ya din jî, bi arengê û bi rengan îşaret li ajalan dixistin. Hinekan li qotî miyê, hinekan li gurçiyê, hine- kan li ser mil û hwd gelek îşaret hebûn. Ya malê me ew bû: di gurçiyê raste de me îşareteka mîna gogê çêdikir. Guhê miyê yê raste jî, me him ji alî pêş him jî ji alî paş ve qilç (hinek jêdikir) dikir û

herkesî dizanî ew miya ya mala Osî Orner e. Ew kevneşopiya me bi ya Oxûzan ve wek hev e û ew jî ne tesedufe.

Ji alî din ve, gelek jêder didin xuyakirin, ku ji berê ve li çivayên Balhana (rojhilatê Xezer) Tirkmenên mîna Oklû, Goklû û Siltanli dijîn. Oklû di jêderên Sefawiya yên sedsala XVI an de bi Eymûr, Salûr, Goklenan ve derbas dibin. Ji giştikan re Tirkmenên Yaka tê gotin. Goklen li jora çemê Cûrcan rûdinişştin. Di vê komê de (gor Vambery 12.000 kon in) Begdilî, Bayindir û Kayî ya bi kêm

hejmar jî dihatin dîtin.(131163) Ji bo ku navê êl û zendan guhartine pir zorê ku mirov rastiyê bibine; wekî mirov li nava şorbe li şopa pûngê bigere ye, ji bo safî kirina vî karî pêwîstî bi komeka pisporan heye. Lê bi qasî min lêkolîn kire, dikarim bibêjim ku Begdilî û Avşar bi îspat Kurd in. Wekî din, Yiwa herdem bi Celaliyan re di tevgerê de ne û ji sedî sed ew jî endamê konfederasyona wan e. Di herikandina pirtûkê de emê hewl bidin ku Kurdbûna wan eşkere bikin. A. Tanen dibeje: Afşar êla Oxûzan ya herî mezin a Tir km en in. Di kevneşopiya Afşaran de jî Afşar bi Kurd ve ji heman kok û binatî ne.(8913) Bayat jî yek ji beren 24 Oxûzan e. Wek "Tirkman Ekradî Taîfesî" derbas dibin.(9163) Wekî berê jî min göte, ekrad di vvata Kurdan de ye. Gelek hevalên min ên Afşarî hene ku em wek sêva bûye du beş in...

Di Dîvanû Lûgat-ît-Tirk de wiha tê nivîsîn; Tirk di eslê xwe de 20 zend in. Her zendekî jî gelek êlên ginêdayî wê hene. Ewên nêzî sînorên Bîzans-Rûm, Beçenek in, paşe Kipçak, Oxuz-Ûxûz, Yemek, Başgirt, Basmil, Kay, Yakabû, Tatar, Kirkizê war in. Kirkiz nêzîkî Çîn in.(134‘28) Zendên ku du zimanan diza- ıiin; Soxdak, Kençek û Argû ne. Yen gerok-koçber jî Xotan, Tûbût û beşek ji Tanxûtan e. Vana piştre hatine weiatê Tirkan. Zenda Çomûl xwedî zimanekî din e; tirkî jî baş dizanin. Zendên mîna: Kay, Yakabû, Tatar, Basmil jî bi vî awayî ne. Her zendekê devokeka xwe heye,

lê tirkî jî dizanin. Kirgiz, Kipçak, Oxûz, Toxsî, Yaxma, Çixil, Uxrak û Çarûkan tene zimanekî xwe heye (tirkî). Heta Peçenekên li sînorê Rûm dijîn, zimanê Suvar û Bûlxaran tirkîka davviya peyva qût dibî ye. Ya herî rind tirkiya Yaxma û Toxsî ye.{134 30) Heman nivîskar dibêje: Oxûz bi Farisan ve pir tevlîhev bûne, ji ber vê yekê, gelek peyvên tirkî ji bîr kirine.(134 7f>) Ew ne jibîr kirine, Oxûz û Faris ji malbatekê ne; ji bo vê jî zi¬manê wan nêzîkî hev e. Xeleka din a balkûş jî tîne ziman, ku Oxûzan ji Tirkên ji Ceyhûn heta bakûrê Çînê rûdinên re gotine Çixil; heta roja îro bihev re şer dikin.{134'394) Kurdiya îro Kurdên li dervayê Welat deng dikin ku gelek şikeştî û tevlîhev e, bi taybetî jî piştî hejmartina dehan (wek mînak: yanzdeh di nava wan Kürdana de wek dewyek tê ziman) ew xwe eşkere dike û gereg bingeha xwe ji vê demê girtibe. Yanê di pêvajoya têkilî û şere vê demê de, zimanê cûda êdî ketin nav Kurdiya wan Kürdana. Navê Çixilî li Tirkan dane û berê jî me got ku vana ji Tirkan re digotine Tawgaç. Yanê navê Tirkan yê berê ne Tirk e û ew'î piştre girtine. Bi hev re şerkirina wan jî cîhê lêkolînê ye; ew jî dîroka ku Fîrdewsî qal dike tîne bîra mirov.

"Tarîxa Neşri" li ser Oxûzan vê agahiyê dide: Wexta kalê Oxûz, Balcas mir, şûna wî lawê wî yê mezin Qerexan derbas bû, Di dema Hz. pêxember de jiya. Baweriya wî bi ola semawî tunebû û bi olekî Asyayî (seretayî) bawer dikir. Kurê wî Oxûzhan jî ji ola bavé xwe heznake û li dij derdikeve. Oxûz bi ola heq bawer dikir. Ew jî di nava bav û law de bû sedema şer. Oxûz malbata xwe heytine û diçe cîhekî din. Di van şerena yekî de bave Oxûzhan Qerexan dimire. Işareta Kayiyan tîr û kevan bû.a60‘12) Ew dema jî hêjayî lêkolînê ye. Bi rastî mirov dema dîroka Kurdên dervayê Welat bi kûrahî dikole, dibîne ku di

nava bira û élan de parçebûneka olî pêk hatiye û ew bûye sedema gelek şeran. Ew bûyera jî dibe ku yek ji wan bingeha parçebûnan bû. là ser vê

bingehê Beranî û Pezgewr derdikevin holê, ku hemû Kurd in lé li ser esasê olî ji hev veqetiyane û şere hev kirine...

Dîroka Oxûzan

Dîroka wan li ser navê "Oxûz" ê ji Boxdûz Beg destpê dike. Li destpêkê ew li navenda Xorasanê bûn. Ihtîmaleka pir mezine, ku navê wan ê berî vê demê jî Saka bû. Ji serdema Boxdûz Beg vir ve ew tê guhartin; sedema wê jî hêz, qudret û jîrbûna Boxdûze. Ji çavkaniyan xuyadike ku ew serokekî pir bi dîrayet û zîrek bûye. Ji bo ku wek nûnerê Oxûzan çûye cem Hz. Muhammed, ew tê wê watê ku wî yekîtiya êlên Kurd jî pêk aniye. Di bê§a li ser navê Oxûzan de me qala Boxdûz kiribû. Taybetmendiyeka êlên Kurd jî ewe, ku piraniya élan navên xwe ji serokên bi hêz digirin. Dîrokzanê Kurd Şerefxan qala wî begî dike: Oxûz Xan, yek ji wan fermanrewayên herî mezin ê Turkîstanê, ji serbilind û serfirazê pêxemberan û efendiyê afirinderan ku wê demê li Medînê dima re, heyetek şand. Serokatiya vê koma han jî yek ji wan mezin û giregirên Kurdan ê bi navê Boxdûz dikir. Ew, mirovekî zehf sik û kirêt, bêperwerde, dilkevir, bêzept û bêrept bû. Dema ewê han ê rû tirş, biqilefet li ber çavên pêxember ket, bêhna wî hat wî, teng bû û jê nefret kir. Dema eslê wî hat pirsîn, wî got: "Ez ji civaka Kurd im"...(157'66) Di vê çîroka bi nav û deng de, niqtên ji babeta me re girîng ew in, ku vê demê bûyîna Kurdan ya li Asya ye û ya din jî, navê Boxdûz e. Bi vê re girêdayî Hoko jî xelekeka balkûş dinivîse:

Di sala 229-245 an de (divê ew hîcrî be-Ş) hinek Kurd anîne li Taloriyê (Warê Beran) bi cîh kirine ku li hemberê Rom û Gürcan welat biparêzin. Navê welatê vê demê kirine Warê Beran (Erdîş, Xelat, Mûş, Xinis, Melazgirt- Melazkurd, Motikan, Hîzan); hinek jî dibêjin Mamokan. Dîsa Sasaniyan ji bo dewletên erîşkar, di salên 421-435 an de ji wan deran

Kurd birine li Xorasanê bi cîh kirine. Kurdên wêderê heta sala 680 an nê misilman bûn.(32)

Di serdema pêxemberêmisilmanan deli bakûrê-rojhilatêMedya dewleta Samanogûllari (kurên Saman) hebû. Sînorên wê dewletê di navbera Xorasan, Sindistan û Maverannehir de diman.(32) Têkiliya vê dewletê bi Boxdûz Beg re hebû an na, nizanim, lê eger derkeve holê ewê gelek xalan ronî bike. Ji gelé vê dewletê re: Gorî, Samanogûllari û Benî Saman dihate gotinê. Li wir binav kirina Goran girînge û îhtîmaleka mezine ku ewên ku ji Gîlanê biri bûn. Ew wek Zazayan tên zanîn. Vana ji welatê Gîlan, Amed û Şeretan anîne û li wan deran bi cîh kirine. Ji bo ku welat li hemberê komela Tûranî biparêzin û destdirêjiya Çîn û Hindiyan bibirin. Dawiya vê mîrîtiya Samaniyan ji alî dîl/esîr ê malê Alp Tekîn ve hatiye dayin û ew di sala 1005 an de bû xwediyê Xorasanê.*321 Ji bo dest dirêjiya Çîniyan û şere bi wan re min di beşên derbasbûyî de çirokek nivîsandibû; ew jî îspateke ku kalê me di nav wan Kurdên biri de hebûne; yan

jî ew di nava têkiliyên nêzik de bûne. Ci heyf û mixabine ku evv Kurdên hanê piştre xwe bavêjin bextê Çîniyan. Xuyaye ku dewleta Samanı jî dewletekê Kurd e; iê ji bo ku Kurd ji sê herêmên cüda birine, mümküne ku ne tene kirmanckî axêf bin û kurmanc jî tevî wan hebin.

Li ser dewleta Samanı Arşakyan dibêje: Di sala 944 an de prensê Samanî, Nûh (943-954) arteşa xwe di bin serokatiya Abû Alî de şand ku bajarê Rêy bigre. Gelek Kurd jî di nava arteşe de hebûn. Kurdên Xorasan û Maverannehir di arteşa Samanî de cîh girtibûn.(3'70) Di vir de Arşakyan dixwaze Samaniyan ne wek Kurd nîşan bide, ew dîtineka ne di dh de ye. Lê eger mebesta wî bi peyva Kurd şaxekî Kurda ye dibe ku rast be. Di vê demê de bi taybetî Mukriyan wek Kurd dihatin binav kirin. Gunnar Jarrîngê di nav Tirkên li Afganistan de lêkolîn kirî dibêje: li gelek deran Mukriyan nave xwe wek Kurd derbas dibû û li ser îddea Tûmanovîç, wana

bi Tirkmenên Goklen re eleqedar dibîne.{89' 12) Di herêma Xorasanê de, siltanê pir derketî pêş Gaznelî Mehmûd e (Siltan Sebûtekîn). Di sala 970 an de hatiye dinyayê û li destpêkê girêdavî Samaniya bajarê Büst îdare dikir. Di sala 994 an de walîtiya Xorasan kir. Di sala 998 an de jî bajarê Gaznê heyna û hukumdariya xwe îlan kir. Di sala 999 an de paytexta Samaniyan Bûxara heyna û dewlet ji holê rakir. Çend caran erîşî Hindîstanê jî kir û di sala 1030 an de mir.(m261 Li ser netewa wî tu agahiyên zelal nînin, lê Tirk wek hemûyan wî jî dikin Tirk. Dewleta Gaznelî ya li Afganistan, Pakistan, Iran û Hindîstanê hatî sazkirin ji alî Gûr an ve (1184-1215) hathihveşandin, Şerafxan dibêje ew Kurd in. Mesûdî (sedsala X.) dibêje ew bi Kurdên li dora Mûsilê ve du êlên bira ne... Agahiya Mesûdî dide gelek girînge, lewra Kurdên Mûsilê wek berê jî min nivîsî, ji ber êrî§ên misilmanan çibûn Arran û li wir dewleta Şadî damezirandibûn. Ew dewlet ji sê konfedarayonên mina Şadî, Badilî û Reşî pêk dihat. Ji agahiya Mesûdî tê fêhm kirin, ku ji wan konfederasyonan yan jî élan yek hîna jî li Mûsil bûye. Di vir de niqta herî girîng ewe, ku êlên ew dewleta hanê avakirine yek ji êlên dewleta Şadî avakirî û kalên Kurdên îro li dervayê welat in.

Bi vî awayî gelek çavkanî didin xuyakirin ku dema beşek ji Kurdan li Asya bû, ew bi Tirkan re tim û tim di nava tekoşîneke de bûne. Lê mixabin di vê sahê de lêkolînê baş pir kêm in. Ew têkosînên dûr û dirêj ji alî F. Sumer ve wiha tenê ragihandin: Il Tirîş Kaxan hewl dida ku dîsa dewleta Tirk damezirîne; lê li dijî wî dîsa Oxûzên ji komên din bihêztir derketibûn. Serokê wan Baz Kaxan bû; pêne caran şer çêbû û Oxûz têk çûn û dewleta wan hihveşiya û ketin bin îtaatê.(13123) Zelal kirina van şerana jî gelek girînge û xuyadike ku yekîtiya Arraniyan wek berê ne fi reh bûye û ew têk çûne. Hêza Oxûzan (dibe ku beşek be) hema hema mîna ya Tirkan bûye ku pêne caran bi wan re şer kirine. Yekê jî navê serokê wan Baz e, navekî

Kurdî ye. Bilge Kaxan dibêje, Oxûz dijminin û li her cîhî tevlîheviyan derdixînin. Bi wran re di navbera salên 715-716 an de pêne caran şer kirin. Cara yekemin li bajarê Toxû Balik (li keviya Tûla ye), ya din li Andirgû ye, ya sêyemîn li Çûş Başi yê bû ku ji êla Tonra ya

Oxûz, Alpavût û 10 meriyên xwe dîl hatin girtin. Ya çaremin li Ezgentî Kadazê pêk hat. Ya pêncemîn jî li keleha Amgî Kûrganê pêk hatiye. Di sala 717-718 an de Oxûzan xwe avêt paş Çîniyan.1131-371 Navê vî begî (Alpavût) hîna jî li ser êleka li Xorasanê maye. Tirk, êla bi navê Alpavût yek ji êla bingehîn a Oxûzan dihesibînin. Bê guman navê êlê li destpêkê jî ne Alpavûte, mümküne ku piştî dîl girtina wî begî nav li êlê dabin.

Ji çavkaniyên ku Kurdan li Asya didin xuyakirin yek Oxûzname û yek jî Secere-î Terakîme ye, ku wiha dinivîse: Çiyayê bi navê Ulû û Qicî Balkan de Tirkmenên bi navê Ersarî dijîn. Di nava Xizir Elî yên wir de êleka bi navê Kurd jî heye. Ev êla Kurd, Gûrî-Gûrlûlar ê ji koka Tirkan bûn.<91,,) Ersarî navê ku Tirkan daniye; ji bo ku "sariya" tirkî di Kurdî de zer e, îhtîmaleka mezine ku êla Zeriyan vê demê li wan çiyana bû ye. Işareteka din ê vê îddeayê bi hêz dike jî ev e: Heta roja îro Zerikî û êlên nêzîkî wan in li Qoçgiriyê di cîhê peyva 'biçûk' de peyva qiçik bikar tînin. Nav lêkirina çiyayê Balkan/Balhanê biçûk (qiçik) jî gereg ji alî wan Kürdana ve hatibe dayîn. Gor gelek îşaret û zelaliyan ew dibêjin Gûr-Gorê ji koka Tirkan e; bi xwe re jî dikevine nav nakokiyê. Çawa navê êlê Kurd û nijada xwe jî Tirk dibin? Di heman jêdeiê de wiha tê gotin: Li destpêka mîladê zendekî Goran li jora Dîcle û Firat bi cîh bûn. Ew jî wek Zaza, Desîman, Çareklî, Dunbulî dibin çar beran.(9M1) Ji vir jî tê xuyakirin ku Gor kalê Kurdên Zazane û ew ji dora Xorasanê yan jî ji dora Siyah-Kûh/Manki§lakê li destpêka mîladê hatine bakûrê Kurdistanê. Wekî tê zanîn Kurdên Dimilî di sala 1240 an de di rêberiya Şemsettin Muhammed de dewleteka bi navê "Padîşahiya Gor-istan û Sîstan" li dora Herat û Sîstanê avakiribûn û

di sala 1371 an de hilweşiya. Zazayên dora Dêrsîm, Ezingan, Meletî, Sêwas, Xarpût û Bîngolê Elewî ne. Elewîtî ji Xorasanê di sedsala XIII an de ji alî zenda Goran (Gur) a girêdayî Oxûzan ve hate wê heiêmê. Di wê de rola êlên mîna Kureyşan û Damasûran jî heye.191-481 Li vir jî him Elewîtî him jî Oxûzbûna Dimiliyan tê destnîşan kirin, ku gelek girînge. Lewra dema qala Oxûzan tê kirin, tê fêhm kirin ku mebesta wan Kurdên li dervayê welat bi giştî ne. Dîsa gor Secere-î Terakîme li keviya rûbarê Seyhûn mintiqeka bi navê "Kurdîşe" heye û berê ji komên li wir dijî re jî digotin "Kurdan".19125) Mînorskî dibêje: Navê êla Kelhûr Goran e. Kelhoran sê milê xwe hene: Pilingan, Derteng û Mahîdeşta. Darna û Dertenga xaka xwe li Hulwanê bû. Mahîdeşt koçber bûn.,2"109) Kelhor berî îslamê li başûre Kurdistanê (Hûlwanê) bûn; ew bi hatina Islamê re reviyan dora Xorasanê. Ji wir di sedsala XIII an de hatin bakûrê Kurdistanê. Gor Rawlînson jî Goran ji zenda Kelhûr têne. Di sala 1639 an de Mûrat ê IV an Kurdên Bacilan li rojavayê Zohap bi cîh kirin û wan jî Kelhûr ji wir derxistin. Mînorskî dibêje navê Goranî du hezar salan kevn e. Goranî ji alî Zazan ve jî tê dengkirin. Warê wanî yekemin Derya Kesk e û di salên 645-660 an de xanedanekî bi vî navî heye.(12'22ü)

F. Sumer dibêje: Di kîteban de, Oxûz li bakûrê çemê Tûla yê xwar dibî de dijîn. Lê gorî ji Istahrî jî radigihîne welatê Oxûzan wiha dirêj dibû: Li rojava

Derya Kesk bû, di sedsala X arı de Siyah Kûh (Mangişlak) dagirkirin, li rojava

bakûrê Bûhara destpê dikir û heta Isfîcabê diçû. Ji rojavayê Seyhûn û ji keviya çiyayên Qereçûk heta Savranê sînorên misilman û Oxûzan bûn. Li bakûr jî çemê îtil bû.(131'62)

Zorlû jî dibêje: Li Iranê, çolên Turkîstanê ku Tirk lê dijin û heta çiyayên ku dirêjî hewza Sindê dibe, Iranî lê rûdinên.(10516) Yanê çawa dibe ku hem welatê Tirka ye, him Tirk lê dijîn û pa§ê Iranî lê rûdinên? Ev çi paradokse?

Di vir de mebesta wî Kurd in, lê peyva Kurd nikare bîne ser pênûsa xwe. Di pirtûka wî giştî de jî xwestiye navê Kurdan qet nenivîsîne. Li Rojhilata Navîn gor wî hemû milet hene, lê ne Kurd. Eger ew îddea raste, wê katê Kurd heta perava Sindê belav dibûne ku raste. Lewra piştre ji wan Kürdana jî gelekî tên Loristanê û ji wir tên Anadol û Sûriyê. Li ser vê yekê jî dîtinen F. Sumer ji me re giranbiha ne: Ti guman tune, ku Oxûz ji herêma Çû û Talasê hatin başûrû Seyhûn, lê nayê zanîn kengê ew hatine. Gor gerokekî ji Xorasanê dibêje, ew di dema xelîfe Mêhdî (775-785) de hatin û bûn misilman. Dibe ku rast be, lewra Karlûkan di sala 766 an de dawî li dewleta Tûrgîş anîn û ew jî bû sedema cîh guhartinan. Di dema waliyê Ebasiyan yê bi navê A. Tahîr (828-844) de Ebasî çûn ser Oxûzan, lê nezanîn li kudenê bûn. Vê artê§ê Oxûz têk birin û 2000 nefer jê dîl girtin.«131-65’

Reşengûn Selçûqiyan Oxûz di sala 1029 an de hatin Rêy; serleşkeren Gaznelî Hacîp Siltan Mesûd (Taş Feraş) piranî Kurd bûn. Taş bi 3000 esker çû pêş wan û di nava wan de leşkerûn Kurd jî hebûn. Serokê Kurd dîl kete destê Oxûzan û wî ferman da Kurdan ku şer bidin rawestandin, lê ew şaş hate fêhm kirin û Taş hate kuştin. Oxûz gîhiştin Maraga û gelek Kurdên Hezbanî (Ûrmiye) kuştin. Kurd bi waliyê Ezerbeycan Wahsûdan II an ve bûn yek û Oxûz vekişîn. Oxûz derbasî Çolemergê bûn û talan kirin. Li çiya 1500 mirî û gelek jî dîl dan û bi bihîstina hatina Tûgrûl Beg re ew derbasî Cîzîr, Amed û Mûsilê bûn.(2 7!i) Bi dîtina min, ya di vê dîtine de şaşitiyek heye, yan jî ew şerekî nava Kurda ye. Wekî li jor jî me qal kire, herdû alî jî Kurd in û divê ew şerekî navxweyî be. Bi ser vê de Kurd di pâşengiya Vehsûzan Bîn Mamelan de kom bûn û Oxûz bi tûndî têk birin. Di sala 1029 an de Vehsûzan Bîn Mamelan li Tebrîzê dewleta Rûwadiye saz kir. Di sala 1040 an de êrîşî Oxûzan dike û wana belav dike.(19'65) Selçûqiyan ji Qerehan û Gazneliyan gelek zordestî dîtin, ji herêma Maverannehir hatin

Xorasanê. Di sala 1035 an de li Nesa Gaznelî têk birin û bi vê yekê îtîbara wan gelek mezin bû û Tirkmen bi grubên mezin tevlî wan bûn. Selçûqiyan jî ew şandin Anadolê.(148-161) Tirkmenên li Ezerbeycanê nexwestin ku di bin desthilatdariya Selçûqiyan de bijin û ûrîşî rojhilatê Anadolê kirin, mîrên wêderê jî ji Tûxrûl Beg re gilî kirin û wî jî ji Tirkmenan re got herin ser Bizansan.(14R IM) Ji vê demê bi şûnde êdî Tirkmenan berê xwe dan rojavayê Anadolê. Hemû dîroknûs dibêjin ku yên berê hatine rojavayê Anadolê Tirk in; ew ne raste; yên ku hatine Kurdên ku wek Tirkmen derbasî dîrokê bûne... Şopa vê mirov li gelek cîhan dibîne û şirova herî xweş ji alî E. Woods ve tê kirin:

Li rojavayê Anadolê gelek navê cîhên klasîk ku Oxûzan tînin bîra mirov hene; ev yek, ji zanyarên Tirk re riya xeyala koça 24 êlên di sedsala XI an de bûye, vekir. Zanyarên Ewrûpî, vê texmîna navên deveran tenê pişti sedsala XVI an de rast dikin. Ji bo wê jî rexne dikin û dibêjin mirov nikare ji bo 400 sal berê bikar bîne.(114'6S> Ji vê dîtine ew encam derdikeve, ku ew nav piştre hatine guhartin. Rastî jî ewe! Dema Kurd hatin vê herêmê navên kurdî danîn û dewlet avakirin; piştre dewleta Osmanî bi peşket û cîhên ku dagir kirin jî nav guhartin. Ew rexne di cîh de ne û pêwîst bû ku ew nivîsarana li ser rastiyê jî serê xwe bieşandina. "Tarîxa Ibn-î Bîbî" ya sedsala XIII an ya Selçûqiyên Rûm LI "Tarîxa El Evamîr" jî tu qala Kayî û Bayindir nake. Di rastiyê de; jêderên nivîskî yen İslâmî berî erîşîn Moxolan qala Doxer, Avşar, Salûr, Yive û Kinik dikin.(1,4'68) Oxûz li sedsala XI an li pozê Anadolê bi cîh bûbûn ku wê demê Afyon jî di nava wan pozpêran de bû ku demekê bû navenda Germiyan.(1917)

E. Woods li ser Oxûzanaman jî dibêje: Li holê gelek Oxûzname hene, lê mirov bi ti yek ji wfan bawer nake, nivîsên têde ne xirav bûne, bi hevre di nakokiyê de ne û her yek cûda ye. Serokên Tirkmenan jî di wê baweriyê de

ne (114-321)

Di "Camûî't-tevarîhê" de, li ser fîzîka Oxûzan wTiha tê gotin: rûyên wan berê mîna yen Tirkên din bû; lê ji hatina Maveraûnehîr bi şûnde, bi bandora hawa û avê, rûyên wan mîna yen Tacik û Iraniyan hatin guhartin.(131‘76) Di vê jêderê de jî înkar kirin û xapandinekê diyare û diziya xwe dide dest. Rûyê wan hema bi hatinekê re nehate guhartin; ew Kurd bûn û fîzîka wan jî mîna Arraniyên din bû.

Kurdên bi navê Oxûz û Tirkmen ku tenê nîşandayîn di dîrokê de rolên girîng lîstine, pir mixabin ku ew hîna jî zêde nayê zanîn û nayê lêkolîn kirin. Li ser van tenê nûserên Tirk nivîsine û w'an jî hewl dane ku têxin forma Tirkan û dîroka xwe; di vê yekê de bi ser jî ketine. Hêvîdarim lêkolîner û dîrokzanên Kurd jî êdî vê dîrokê bi kûrahî bikolin û rastiyê hîn eşkere raxin ber çavên mirovahiyê. Nûserê Tirk ê ku bi taybet li ser Oxûzan nivîsî dibêje: Oxûzan ji salên 1164-1165 an bi şûnde hêdî hêdî girîngiya xwe ya siyasî wenda kirin. Bê guman sedema vê ya herî girîng ew bû; ku ew ne xwedî serokekî hevbeş bûn. Ji ber wê hêdî hêdî heliyanT31144) Ewr jî rastiya êl û federasyonên êlên Kurd derdixe holê: Eger ew sîstema, wekî car caran kirine, veguhaztina dewleteka bi berdewam û serokekî bi hêz, îro rewş cûda dibû. Ji bo ku ew nekirin, li hem- ber dijminan nikarin rawestin û ji salên 1174-1181 an bi şûnde jî temamî belav bûn. Begên mezin ên zû mirin jî bandoreka negatîf di vê yekê de derxistin holê. Bi ketina Merv û Serahs ve, dîroka siyasî ya Tirkmenan li Xorasanê teva bû. Ji wan beşekî mezin çûn Kirman, hinek ji wan çûn Farsê cem Salgûran. Beşekî mezin jî çûn Anadolê.1311441 Ew belavbûn heta roja îro berdew'am e. Li gelek bajarên Tirkan îro em beşek ji neviyên wan dibînin, zimanê xwe wenda kirine, bi gelên din re zewicîne û êdî ti têkilî û gumana wan a li ser nijada wfan nemaye!

SELÇÛQÎ (1040-1157)

Cîhên bi navê Kurdan yên li Asya

Heta vir me gelek caran îşaret pêkir ku berê hinek Kurd li Asya jiyane; bi taybetî jî berî hatina Tirk û Moxolan ew li wir mane. Mirov dikare bibêje ku navenda vê herêmê Xorasan e. Ew Kurdên ku bi sedsalan li wir jiyane, bê guman li paş xwe gelek belge, heykel, nav û îşaret hîştin. Herçiqas li ser vê lêkolîn pir kêm in jî, yên hatine kirin jî nîşan didin ku Kurdan gelek navên kurdî li erd, bajar û herêman danîne.

Heta Kurdan li wir bajaran avakirine û li ser vê yekê Doç. Yilmazçelîk dibêje: Di nava delta Ceyhûn de "Kurder Şehr- Şehra Kurdan" û " Kurder Ark-Erqa Kurdan" hene; îhtîmale ku cîhê wan Kurdên ku me li jor qal kiriye ne. Hebûna Kurdan diçe gelek zeman berî vê; paşê bi Tirkên Hûn ve koçê Anadolê kirin. Ew yek li bakûr û rojavayê Derya Kesk pêkhat. Delîla vê Kurdên li Macar, Çek û Slovakya ne. Ewên di başûre Xezer re çûne jî li Iran û Anadolê bi cîh bûn.(,,6'4) Ji wir em vê encamê derdixin: Di dema Hûnan de, ew Kurd ji ber wan reviyan û hatin Anadolê. Me berê jî qal kir, ku hinek Kurd ji ber wan reviyan Anadolê û wan jî heta Hatayê ew şopandin. Îhtîmaleka mezine ku ew Kürdana derbasî Sûriyê û Libnanê bûn.

Dîrokzan û erdnîgaiê Gazneyî Gardizî dibêje: Li rojavayê Sibîrya, konfederasyonek élan bi navê Kimak hebû û ew ji heft élan pêk dihat. Di nava wan de qala êla Bayindir yan jî Balandûr dike.(114 67) Bayindir, yek ji êla Oxûzan e; ew êla paşê dê bê Kurdistanê û bibe bingeha dewlata Akkoyûnî-Pezgewran bi navê clin jî Bayindir. Di nava Akkoyûniyan de Mirdêsî, Zerikî, Badilî û gelek êlên din hene ku piraniya wan niha li Anadolê û Xorasanê dijîn. Nasir-i Husrev, di Zafernamê de: Li navbera bajarên Belh û Merevrod de qala mintiqa Cûzcan dike. Li dawiya kîtebê tê fêhm kirin: ku di sedsala IX an de li gelek bajarên herêmê Kurd desthiladar in û di nava wan de Anhoy-Andhoç jî heye(150~ 6)dinivîse.

Gorî ku Taberî dinivîsîne, ev Kurdên ku li Xorasan, Afganistan li rojhilatê başûre Gola Aral dijiyan di bin serokatiya Berham Çopîn de bûn. Wek em dizanin ew qehremanekî pir bi nav û deng e.

Di sedsala X an de Istakhrî jî dibêje ev kewmên pez xwedî dikirî bûn. Prof. Z. Welidî jî dibêje li nêzîkî Heratê, li kêleka çemê Herî-Rûd ê navçeyek bi navê Kurd-Neşîn (konax) heye. Li Kûhî Reş (Mankişlak) dewleteka Tirkmenan hebû, serokê xwe Kafşût bû û di sala 1128 an de Atsizê kurê Harîzm Şah Muhammed wira heyna. Tirkmenan bi qehremanî şer kirin, lê têk çûn. Balhanê li başûre rojhilatê Derya Kesk ji berê ve warê Tirkmena yê bi ewlê bû. Ji bere ve karibûn tenê li wir bisekinin.(l31137) Ji wan cîhên ku navê xwe derbas dibe beşek min dîtin, wekî bê texmîn kirin cografyayên gelek çiyayî ne û ji bo kamûflajê û şere gerîlatiyê baş in. Di wan deveran de Kurdan heta hatina Tirkan xwe parast.

Kurd li Asya

Li ser hatina ji bakûrê Derya Kesk de û cîhên ku bi navê Kurdên kirmanckî axifê li Asya, Kocadax dibêje: Di dema Selçûqiyan de, ji Xorasan û Ezerbeycanê hatin herêma Erzirûm û Dêrsîmê. Di navbera Derya Kesk û Aralê de li ser girê Mesa Alandûzû-Navça Alan û Girê Alanî heye. Di dema fetîhbûna Anadolê de, Alan, Lolan û Balaban bihevre di tevgerê de bûn. Zazakî diaxifîn.,17'214) Berê jî me nivîsîbû ku Alan îro jî li Kurdistanê dijîn û ew ji Asya hatin. Heta beşekî bi wan re girêdayî bi Macaran re çû Ewrûpa. Bi vî awayî cîhên ku ew jê hatine jî diyar dibin.

Dîroknas dibêjin cara yekemîn ji alî Beranî (Qerekoyûnî) û Akkoyûniyan ve serê mîh û beranan wek sembol hate çêkirin. Di sedsala XII û XIII an de êlên Tirkmen ji Qersê heta Dêrsîm, Akşehir, Afyon û Aydinê ew heykelana

çêkirine.(191'5) Ew cîhê heykel îro lê têne dîtin jî nişana îstîqameta koçê êlên Kurd û cîhbûna wan nîşan dide. Bi rastî jî gelek kevirên pir hunerî mirov dikare li ser vê riyê bibîne. Hêjayê gotinê ye, ku hinek jî li Loristanê hene. Di nava Bextiyariyan de gelek in. Ew kevirên bi vî awayî belav dibin nîşana belav bûn û parçebûna êlên Kurd e. Yanî ewên li Asya, dema Tirk û Moxol hatin di nava wan re derbas bûn. Yên li bakûr di bakûrê Derya Kesk re hatin bakûrê Kurdistanê. Beşa din ê başûr jî, çûn Loristanê û ji wir berbi bakûr hatin.

Pirtûka li ser kevirên goristanê li Afyonê hatî amadekirin de peyveka balkûş derbas dibe: Di dema siltan Mesûd de, bajarê Akroenosî xirabe bû. Tirkên bi navê Çereşan li wir bi cîh kirin û ji wir û pêve ew wek "Qerehîsar" hate bi navkirin.(1916) Ew navê Kareşan mirov dikare bi du şiklan şirove bike, yek: Eger mirov vê peyvê bike du beş dikare bibe kar-reş/bizin-reş, yanî ewên ku karê/bizinê xwe reş in. Wekî tê zanîn Tirk jî bi êlêka Kurd re dibêjin "Qere-keçîlî=bizin-reşan". Mirov li vir dibîne ku çawa wana nav guhartine û zivirandine tirkî. Piştre jî dibêjin ew Tirk in. Ya din jî ewe, ku mirov dikare bibêje ew Reşî bûn. Gor kevirê ji perestgeha Qerebaba hatî (muze) Tirkmenên li (Afyon) wir di sala 1156 an de bi cîh bûne.(19115) Eger hatina Tirkan ya Xorasanê 1040 bê qebûl kirin; maqûle ku Kurdên li wan deran di wan salan de hetanî Afyon bên û li wir bi cîh bibin. Kevirekî bi vî rengî li Meletî jî hate dîtin, wek tê zanîn Germiyan li destpêkê li wir bi cîh bûbûn û piştre jî hatibûn dora Afyonê. Ew kevirana cîhên ew lê nîştecîh bûne û berê hatina wan jî didin diyar kirin. Ji bo vê jî em dibêjin cara yekemîn Kurdan rojavayê Anadolê zept kirin.

Dîroka Selçûqiyan

Hatina Tirkan ya berbi rojava, eger mirov Hûnan jî wek Tirk bihesibîne bi wan re destpê dike. Bi dîtina min, ji bo koka Hûnan pêdiviya lêkolînên berfireh heye û di Tirk bûna wan de gumanên min gelek in. Rafael Blaga,

ûrîşa Hûnan yê yekemîn a li ser Atûrpatkana (Ezerbeycan) di sala 227 an de dide xuyakirin. Dr. Yilmazçelîk jî dibêje: Hûn di riya Qefqasan re di sala 363¬367 an de heta Rihayê çûn. Ya duyemîn jî, di sala 395 an de, ji dora Don, êlên

Hûn di bin serokatiya Basik û Kûrsik de bi riya Erzirûm û Firat hatin Meletî û Edenê. Di jêderên Ereban de ji bo Ak-Hûn (Hûnê Spî) an, Kurd û Ekradî

Bilasagûn tê gotin. Koça din jî di sata 466 an de pêk hat ku Axaçeriyên girêdayî Hûnan hatin Ezerbeycan û rojhilatê Anadolê.(U6"13) Bi rastı ew ditin pir balkeşe! Axaçerî wek tê zanîn kurmanc in û hin li dora Mereşe dijîn. Ekradî Bilasagûn jî mirov dikare wek Sakayên Bala tercüme bike, ku divê Kurden Ler/Lor bin. Ew agahî ji gumanên min re dibe tercüman; lê vê pirsgirêkê ez ji dîrokzanan re dihêlim. R. Blaga, riya hatina Tirkan ya Iranê ya berî îslamê wiha dide: Ji rojhilatê Xezer, çemê Etrek-Tecen û li rojavayê Aras-Kûra yê ve berbi başûr xuya dike. Piştî îslamê jî piranî di başûre Xezer re hatin rojava. Hûn li çiyayên Ural koçber dijîn.195 84,3' Rêwîste bê zanîn; ku gelek nivîskar û lêkolîner hatina Tirkan û ya Kurdên li dervayê welat bi navên Tirkmen, Oxûz û ekrad ve tevlîhev dikin, piraniya nûserên dîrokê jêderên xwe nivîskarên Tirk in; ji bo wê jî Tirk û Kurdan û Kurdên cûda zarava axêf ji hev nakin der û teoriyên xwe li ser bê bingehiya jêderên Tirk ava dikin. Bê şik qebûl kirina teoriyên Tirkan bi dîtina min gelek teng e û ew jî rê li gelek şaşîtiyen dîrokî vedike. Eger Hûn Tirk in, têkiliya wan û Selçûqiyan çi bû? Min heta rojaîro ti girêdana wan bihevre nedît...

6 Katalog No. la 7 Katalog No. 15

Kütahya(191>

Di beşa Ebasiyan de jî me nivîsîbû, ku Xelîfe Harûn el-Reşîd (786¬809), êlên Kurdên bi şervaniya xwe navdar ên mîna: Badilî, Reşî û Şadî ya ji Kandahar, Mazenderan, Xorasan û Sîstanê anîn û di xeta navbera Canîk (Samsûn), Qeyserîû Sîs (Adana) ê de li hemberî Bizansan wek mertalên îslamê bi ah kiribûn. Kurd wê demê bi komên mezin li wê cografyayê bi cîh bûn. Xuyaye wê demê hinek Tirk jî bi wan re hatine yan jî Tirk bi awayekî din hatine û di arteşa Ebasiyan de bi berpirsiyartiyên cûda kar kirine. K. Kara dibêje: Di sedsala IX an de, dİ xeta Tarsûs, Meletî û Erzirûmê de şere Ebasî û Bîzansan çêdibû. Di arteşa Ebasiyan de bi piranî fermandarên Tirk wezîfe digirtin û ew bi Tirkmenên ji Xorasan û Turkîstanê hatine ve li hember Bizans şer dikirinî148" 230/3 *' Ew Tirkmenên ku tên qal kirin jî kalê min in. Bê gu man ew Kurdên ji navenda Xorasanê anîne û Tirkên di nava fermandarên Ebasî de kar dikirine

misilmantiyê di şikil de be jî qebûl kirine û di bin ala xelifetiyê de ew şerana dikirin. Mirov dikare bibêje, ku yen wê demê hîna jî li Xorasan û herêmên din mane misilmantî bi temamı nepejirandibûn. Ew rewşa ji cûdabûna Beranî û Akkoyûniyan re bûbû bingeh û ew nakokî ya zêde ne kûr be jî divê di vê serdemê de jî hebe...

Şerîf Firat bi awayekî din hatina kalê xwe Kurdan dike: Tirkên îro bi zaravê kurmancî û zazakî diaxivin û wek Elewî, Sersor û Bektaşî tên nasîn sedsala IX, X û XI an mîladî ji Turkîstan, Xorasan, Nîşabûr û Harezmê hatin. Beşek jî pa§ê ji Anatoliya Navîn hatin Kurdistanê û bi cîh bûn. Firat, dema Tirk dinivîsîne xuyaye ku mebesta wî Kurd in, lê nikare binivîse û koka xwe înkar dike. Lê dîtina wî raste û gelek Kurd vegerîn Kurdistanê (wekî Kareşan- Qeregeçî). Li ser wê K. Kemal Kop wiha radigihîne: Di sedsala IX an mîladî de, ji Turkîstanê, Tirkmen hatin Anadolê û gelek jî li newalên Dîcle û Firatê bi cîh bûn. Piştî Alpaslan deriyên Anadolê vekirin, dîsa gelek êl hatin û li Dêrsîm û Ezinganê bi cîh bûn.(12719) Deriyên Anadolê berê

jî Kurdan vekiribûn lê rastiyêk heye, ku Kurd piştî Ebasiyan jî heta dema Selçûqiyan dem bi dem hatin Anadolê. Li rojava her ku Bîzans vekişîn Kurdan cîhên vala tije kirin.

Berî ku Selçûqiyên (şaxâ Tirk) werin jî, li Kurdistan û Anadolê Kurd dijîn. Ji destpêka dîrokê heta roja îro ti caran Kurd ji Anadolê kêm nebûn. Berî hatina Selçûqiyan, li Kurdistanê Merwanî û gelek mîrîtiyên din desthilatdar bûn. Ew xwedî dewleteka bi rêk û pêk, bi heyî, di nava ewlekarî û aştiyê de bûn û li ser navê xwe pere derxistibûn. Vê yekê nivîskanê Rûs Avyarofî jî dipejirîne: Berî Selçûqî werin Kurdistan û Anadolê Kurd li wan deran dijîn. Wek mînak, Kurdê li Hukumeta Bergama, Qastamonû, Kurdîbolî, Menteşe, Hamidelî, Engorî, Çanqirî, Çorûm, Qereman û eyalata Rûm (Sêwas) ê dijîn.(28) Ew Kurdên ku Avyarofî dinivîse îhtîmaleka pir mezine ku Kurdên di dema Ebasiyan de hatine. Iro jî neviyên wan li rojavayê Kurdistanê, Anadola Navîn û rojavayê Anadolê dijîn.

Wekî gelek lêkolîner û dîroknûsên dîroka fermî ya dewleta Tirk dibêjin, ku Selçûqî peşêngên Tirkan yên ku ji Asya hatine Anadol, Rojhilata Navîn împeratorî çêkirine. Ji bo ku ewê bingeha dewletê avêtî navê xwe Selçûcj bûye, navê dewletê jî kirine Selçûqî... Lê wekî me li jor jî qal kir, Selçûqî jî bi temamî ne Tirk in. Eger mirov Selçûqiyan li ser du piyan bide ber çavan yek ji wana, heta yê girîng Kurd in. Di esas de piraniya Selçûqiyan: Oxûz-Tirkmen-Kurd in. Li jor min qala wan kir, di beşûn pûş de jî emê qal bikin. Hinek dîroknûs dibêjin Tirk di sala 1036 an de hinek jî dibêjin 1040 an de hatine welatê Kurdan Xorasanê. Di "Dîroka Merwanî" yên Kurd de wiha tê gotin: Di sala 1040 an de dewleta Deylem li Xorasanê hihveşiya û Tûxrûl Beg bîn Mîkaîl bîn Selçûq bû hakimê Xorasanê. Sala 1043 an Tûxrûl du serleşkeren xwe bi 10.000 siwariyan ve şandin dora Amedê û ew welata da wan. Yekî navê xwe Bûxa yê din jî Nasixlî bû. Paşû di nava wan

bi xwe de şer derket û Emîr Nasrûddewle jî ji wê sûd wergirt û ew têk birin. Ew hatina cara wan ê yekemîn bû, berî wê demê,

kesî rûyê wan li wî welatî nedîbû...(13152) Belê wekî tê gotin berî wê ti kes rûyê Tirkan li Kurdistan nedîtibû û berî hatina wan Kurd li ser welatê xwe xwedî gotin bûn ku xelîfên Bexda yê kumê xwe li ber wan derdixistin.

Şah Silêman, damezirenêrê Selçûqiyan e, kengê hatiye dinê nayê zanîn. Dema Melîkşah derbasî Anadolê bû ji Tirkmenan arteşek çêkir û bi Bîzansan re şer kir. Ji Derya Spî heta Marmara kire bin desthilatdariya xwe. Di sala 1080 an de heta Kadikoya Stenbolê çû û Iznîk kire payîtext. Hukumdariya xwe bi Ebasiyan jî da pejirandin û di şere (1086) hukumdarê Şame Tûtûs de mir.(13'232> Di vê polîtîkayê de Tirk van jî Selçûqî û Osmanî gelek bi jêhatîne ku hêza îslamê ji bo berjewendiyên xwe desthilatdarî baş bikar anîne. Di bin navê cîhadê de piştgiriye wergi rtine, Kurd tir sandine û mîrîtiyên wan yek bi yek ji holê ra kirine. Lê, li ser damezirenêrê dewletê jî gu man heye. Çawa ji bo Osman Beg tê gotin ku Osmanî avakirî heye, ji bo wî jî Dr. Abdulkerîm Ozaydin dibêje: Dewleta herî mezin a di dema îslamê de Tirkan damezirand împaratoriya Selçûqî (1040-1157) ye. Selçûqê ku navê xwe daye dewletê, kurê Dûkak ê ku begekî Oxuzan e. Leqeba wî "Demîr Yayli-Hesin Kevanî" bû. Ti agahiyên berî Dûkak nînin. Selçûqî, yek ji 24 berên Oxûzan Qinikan e. Ji ber nakokiyên navxweyî û ji ber Yabgû yê Oxûz, Selçûq welatê xwe -Yenî Kent - terk kir û hate mintiqa Cend. Li wir bû misilman. Yabgû yê Oxûz memûr şandin ku bacê jê bîstinin û wî jî got: "Misilman bacê nadin kafiran" û li hember wan cîhad îlan kir.(13ü) Di beşûn derbasbûyî de me hewd da ku îspat bikin Oxûz kalên Kurdên îro li dervayê welat in. Ji vê îddeaya Ozaydin derdikeve ku nijada Selçûq ji Oxûzan e. Herçiqas pêdiviya vê bi lêkolînê zêde jî heye, mirov dikare vê encamê derxe ku parçebûna Oxûz-Kurdan li ser nakokiya olî ye. Ewên bûne misilman olî dane ber netewa

xwe û girîngiyê nedane Kurdbûne. Her çiqas navê Selçûq wek Tirk xuyabike û wek Tirk derbasî dîrokê bûye jî ew Kurd in... Di şere herdû aliyên Oxûz de kurê Selçûq, Mikaîl mir û wî jî torinê xwe Çaxri û Tûxrûl bire cem xwe. Nav û dengê Selçûqiyan belav bû. Bi ser vê de Samaniyan (874-999) ji ber êrî^ên Qerehaniyan navça Nûr a di navbera Buhara û Semerqentê de dan Selçûqiyan. Li hember ârîşûn Qerehanliyan Tûxrûl vekişiya çolê û Çaxri jî bi 3000 siwarî êrîçî (1015-1021) Xorasan, Rêy, Ezerbeycan û dora Wanê kir. Ew ârîşeka keşfâ bû û bi serkeftî derbas bûbû.(1301) Di wê navbera de Yûsûf Qadir Xanê Qerehanî û Siltan Mehmûdê Gazneyî li ser "îran û Tûran" lihev kirin. Gor wê lihev kirinê Selçûqî gereg bihatana ajotinî Xorasan.(130_2) Bi ser êrî§an de Selçûqî di sala 1035 an de ji Ceyhûn ve derbasbûn û bi 10 hezar siwarî çûn Xorasanê. Li wir pir bûn, Îsmaîlê Harzemşah jî bi wran re alîkarî kir û bi hêz bûn. Siltan Mehmûd erîşî wan kir lê di sala 1038 an de têk çû. Di sala 1040 an de jî li Dandanakan arteşa Gaznelî têk çû û Tûxrûl bû hukumdarê Xorasanê.(13ü 3) Ibrâhîm Yinal li hember Tûxrûl serhildan derxist û di şâre yekemîn de Tûxrûl têk bir. Paşö Tûxrûl ji Kavûrd (Kafşût) û Alpaslan alîkarî girt û ew têk bir, sal 1059 bûT30'^ F. Sumer dibêje: Kafşût, serokê dewleta Tirkmenan yê li Mankişlak bû. Gor Ibnûl Esîr dinivîse, desthilatdarên wir wek Melîk dihatin nasîn û di

sala 1128 an de Atsizê Harîzm Şah Muhammed ew dera zept kir, Tirkmenan bi qehremanî bajarên xwe parastin lê têk çûn. Atsiz gelek xwîn rijand û her der sewitand. Tirkmenên wir azadiya xwe wenda kirin.(131136)Wek ez texmîn

> J

dikim ew Kürden dimili axêfin.

Selçûqiyan, li destpêkê erişî sînoren Ermem, Bizans û Kurdan kirin. Bi taybetî jî erîşî Ermen û Bizans. Dema emîr Selçûqê Tirkmen ji rojhilat hate

Trane misilmantî qebûl kir. Ji vê şunda bi arteşâka mezin erîşî Xorasan û Ermenistanê kir. Ji bo ku gelen li wir dijîn ne misilman bûn, gor Ereban valahiyeka eskerî hebû û arteşa wir ne bi hêz bû ku bere ârîşâ wir kir. Eğer ârîşe Iran, Kurdistan û Erebistan bikira wê demê dikarîbû raste dijberiyeka misilmanan ya bi hêz bihata. Lê êrîşên li ser Xorasan û Ermenistanê hatin kirin berovajî yarmetî ji misilmanan girt. Li ser vê tê gotin ku di navbera serokên Selçûqî Tûxrûl û Çaxri de li ser êrîşa rojava nîqaşek pêk hatiye. Di dawiya vê de, biryar didin ku li destpêkê herin ser Arranê. Lewra ew herêma di destê malbatên bê hêzê mîna Şadî û Rewadî de bûn. Lê vê demê jî pêwîst bû ew bi Gurcî û Ermanan re jî şer bikin û bi vî awî dikarîbû hêza wan lawaz bibûya.<l311l3) Kurdên li Xorasan û Arranê wê demê bi piranî misilmantî bi temamî nepejirandibûn û vê yekê jî dijberiya misilmanan zêde dikir. Ji ber vê sedema olî misilmanan, alîkarî û piştgiriya Selçûqiyan kirin. Beşekî mezin ji êlên girêdayê kurê Emîr Selçûq, Aslan di sala 1025 an de derbasî Xorasan bûn. Di sala 1037 an de li bajarên Ermeniyan komkujiyên gelek mezin kirin. Ermen, Kurd û Erebên ji alî xelîfê Orner va li wir hatibûn bicîh kirin di şûr re derbas bûn. Paşû Kurdên li çiya yekîtiya xwe çêkirin û Selçûqî têk birin, lê mixabin paşê dîsa Kurdan winda kir û Selçûqiyan bajarêTûs heynan. Li wir 100 hezar mirov kuştin û 150 hezar jî dîl girtin.(38> Di sala 1041 an de Dewleta Selçûqî hate damezirandin. Tûxrûl, di sala 1043 an de ji xelîfe re nameyek nivîsî û alîkarî wergirt û paşê Nisêbîn, Farqîn, Sîncar, Habûr heynan û Amed rûxand... Di dîroka Amedê de jî tê gotin; ku Tûxrûl cara ewil di sala 1062 an de hate Ezerbeycanê, paşê jî bi xwe hat Arranê û gelek mîrîtiyên biçûk kirin bin desthiladariya xwe. Bi xwe vegeriya Iraqê û li cîhe xwe ji bo dagirkirinan Yaqûtî hîşt. Wî jî, wek dîrokzanên Ermenî dibêjin serdarên Cemcem û Iskûlû, da cem serdarên Xorasan û wan dagirkeriyê berdewam kirin. Ew, pêşî li dora Erxanî yê kelehên mîna Bagîn û Tilham heynan. Paşê

bi Nîzamûddîn Nasrê Merwanî ve bûn yek û bakûrê Dicle û Firat heynan. Bi ser vê de împaratorê Konstantin Dûcas artûş şand ser Amedê û têk çû.(137'213) Di dema Tûxrûl de, mintiqa Ahwaz û Xuzîstanê di destê Kurdê bi navê Hezaresb de bû. Gor Avcioglû ew bû zavayê Selçûqiyan û şêwirmendê Tûxrûl, hertim li kelêka wî bû û paşû Basra jî dane wî. Di sala 1065 an de Alpaslan êrîçê Kurdên ku li sînorên Hîlvanê riya bazirganan dibirîn kir û ew di şûr re derbas kirin. Beşek ji wan Kurdên ku aman anîn di ewlekariya riyan da bi kar anîn.(23)

Farûk Sumer dibêje: Beri Selçûqî bên, ji Oxûzan komekê li Xorasanê bû, lê ew kijan bûn em nizanin. Di sala 1021 an de Selçûqî 180 km li nêzîkî Bûhara

(herêma Nur) dijîn.(131'93) Bi dîtina min ew hatin Loristanê. Her çiqas belge niha tunebin jî, pişti du sed salan li wir Kurdên wek Oxuz tênê bi navkirin xuya dikin û divê ew koma be. Heman nivîskar radigihîne ku Gaznelî Mehmûd îcaze daye ku 4000 konên Oxûzan herin Xorasanê û ew li deşta Serahs, Feravê û Abîwerdê bi cîh bûn. Pişti mirina Arslan Yabgû wana nexwestin di bin desthiladariya Selçûqiyan de bijîn.(l31~%) Ibn ul-Esîrjî dinivîse ku ji Oxûzan2000 kon hatin Esfehanê. Mehmûdê Gaznelî ji serokê Deylemî Kakûye Ala û Dewle xwest ku yan wana, yan jî serê wan bişîne. Li ser vê, Oxûz çûn Ezerbeycanê.*131 97J Deylemî xanedaneka Kurd bû ku desthilatdarê Esfehan û Hemedanê bû. Hakimê Ezerbeycanê Rewadî Vahsûdan Oxûz bi biratî peşwazî kirin û ji wan bi keçekê re zewicî. Oxûzan li wir, li bajarê Meraga mizgeftek şewitandin û ji êla Hezebaniyê mirov kuştin. Ihtîmaleke ku Vahsûdan jî ew şera pê dabe kirin, lewra navbera wî û serokê Hezebaniya Heyca ve tunebû. Paşe herdû jî li hember Oxûzan bûn yek û Oxûz çûn Iraqê. Oxûzan, Li Ezerbeycanê bi Ermeniyan re jî şer kirin.11311071 Bi cîîtina min sedema vî şerî cûdabûna olî ye. Kurdên ku hatin hîn nebûbûn misilman û ji bo wê jî mizgeftên

birayên xwe yen misilmantî pejirandî şewitandin. Di derdora salên 1050 an de dewleta Deylemî (Buveyhogûllari) bi îttîfaqa Tirkan re erîşî Oxûzan kirin; têk çûn û dewleta 200 salı jiyayî hilweşiya.(131"119) Hezebanî li Urmiyê di bin serokatiya Ebûl Heyca de dijîn, ji cîrantiya Oxûzan bêzar bûbûn û bi wan re şer kirin. Oxûzan jî gundên Kurdan gelek talan girtin û kes kuştin. Oxûzan ji ber xisimtiya Vahsûdan, li

Ûrmiyê cîh girtibûn. Lewra, E. Heyca el Hezebanî dijminê Vahsûdan bû. (131"

108)

Farûk Sumer dibêje: Selçûqî di sala 1035 an de hatin Xorasanê. Wê demê Xorasan cazîp bû û ew texmîn dikirin ku dê bi hêsanî bigirin. Selçûqiyên ji Seyhûnê ve derbas bûn bi riya Mervê hatin Nesa û 10 hezar eskerên wan hebûn. Tirkmenên li wir bi dûrxistin. Tirkmenên di bin desthilatdariya Yinali ye Selçûqî de bûn.(131100) Hîna jî êleka bi navî înalû heye û Kurd in. Begê Selçûqî nameyek ji serokê dîwana Xorasanê Sûrî re şand û diyarkir ku ew girêdayî Xelîfe ne.(13M03) Navê serokê dîwana Xorasanê Sûrî bûye ku navekî Kurdî ye û tê wata sor, yanê kesê kej. Heman nivîskar niqteka din jî eşkere dike û dibêje: Selçûqiyan bawerî bi Oxûzan nedianîn û her dem ew di bin çavdîriyê de digirtin.(13M05) Bi gotina Selçûqî mebesta wî Tirk in û Oxûz jî Kurd in.

Vê yekê Gunduz wiha tîne ziman: Tirkmen li Erran, Urmiye, Hoy, Mûgan, Nahcivan, Erdebîlê gelek zêde bûn. Li Farsê Yîva, li Xuzîstanê Avşar, li rojavayê Iranê Salûr, pasê jî Yîva piranî pêk dianın. Şehrî Zor, Mûsil û Şam jî mintiqa din ê ku Tirkmen lê kom bûne. Selçûqiyan li Xorasan dewlet avakirin bi şûnde, hejmara Tirkmenan kêm bû. Yekemîn koça mezin a Tirkmenan wê demê pêk hat. Ya duyemîn jî di dema Moxolan de bû. Çepnî ji alî Selçûqiyan ve ji rojavayê Derya Reş re hatin şandin. Ewên li sînorên Bîzans jî, ji alî rêvebirê dewletê ve li destpêkê wek bûyerên

rojane hatin şirove kirin, lê paşû dîtin ku ew bi felaketekê re rû bi rû ne.(115"27) Bi

hatina Selçûqiyên Tirk re Kürden li Maveraûnnehr, Xorasan, Asya Navîn reviyan cîhên çiyayî yên li Kurdistan û Arranê. Ew komên pir mezin ku li wir kombûn, piştre hatin rojavayê Anadolê. Di vê niqtê de dîtina Gunduz raste û belavbûna Kurdên li navenda Xorasanê nişan dide. Tespîta li Farsê Yîva û li Xuzîstanê jî Avşar giringe û me li jor jî gotibû ku beşek çû Loristanê.

Bavé dîroka Tirk Sumer rastiyeke vviha eşkere dike: Dewleta Selçûqî Oxûzan damezirand; sînorên wê Oxûzan fireh kirin. Ji welat (mebesta wî navenda Xorasanê) kom bi kom dihatin û ji alî dewletê ve ji Bizans re dihatin şandin; sedema vê yekê ew tevlîheviyê dernexin û pirsgirêka mêrgan çaresêr bikin bû.(13l l27) Sedema heri girîng erd zeptkirina wan bû; Selçûqiyên milê Tirk pêk tinin, Oxûzên Kurd wek maşik bi kar dianın û didan peş. Ji bo ku yekîtî di navbera wan de tunebû jî, paşû Oxûz ji Tirkan re bûn xwarin. Eger di nava wan de yetiyeka bi hêz hebûya îro di cîhê dewleta Tirkiyê de dewletaka Kurdan li Anadol û Kurdistanê hebûya. Niqteyeka din ê balkûş eşkere dike û dibêje: Di navbera fermandaran Tûxrûl û Alparslan de kesekî ji Tirkmenan peyda nedibû. Ji bo dewletê Tirkmen lingê düvemin girîng bû.(13M27) Li wê demê jî xuyadike, ku Tirkmenên bi her awayî dihatine bikar anîn, hêzeka weqas girîng mina milê dewletê vê dinî di rêveberiya dewletê de cîh nagire. Ew jî vekirî dijminatî, bê bawerî û tirsa Selçûqî-Tirkan yê ji Oxûzên Kurd derdixe holê. Di cîhê Oxûzan de, fermandar ji miletên din ên mîna Ereb, Faris û yên din dihatin hilbijartin. Di encama vê de jî li Oxûzên Kurd gelek komkujiyên bê vîjdanî pêk hatin.

Tirkmenên berê hatin Ezerbeycanê û bi Vahsûdan re hevkarî kirîn, di sala 1041 an de rastî îxaneta wî hükümdarı hatin. Vahsûdan, 30 serokên Tirkmen di ziyafetekî de da kuştin. Ji ber vê yekê Tirkmenên li wir nikarin bisekinin û şere bi wî re kirin winde kirin û li der û doran belav bûn. Hinek çûn Urmiyê û ji wir jî çûn Colemergê. Beşek çû alî Botan û Batman û hinek jî li Amed, Farqîn û Mêrdînê belav bûn.(137"202) Ji bo belavbûna Kurdan ew girînge lê mirov nizanê kijan êl in.

Nûserê herî zêde li ser Oxûzan nivîsî Sumer e, ji bo vê jî em wek jeder ji wî zêde sûd werdigirin, lewra di nava hevokan de mirov rastiyê dibîne. Gor wî, bi avabûna Selçûqiyan re, ji welatê Oxûzan (Mangişlak û Balhan) pel bi pel koç hatin rojhilata nêzik. Komeka gelek mezin jî sala 1054 an çû bakûrê Derya Reş (131-89) jivê q guman nîne ku ew Kurd inû piştre jî ew hatin Anadolê. Jêdeiên Rûsên wê demê gelek qala kejbûna wan Oxûzan dikin. îro di nava Kurdan de bi taybet jî di nava yên koçber de zerîbûn gelek balkeş e. Eger mirov bala xwe baş bide Kurdên Lêk, Alanên kirmanckî û kurmancên li Anadol û Xorasanê ew zerîbûn pir balkâşe.

Bi hatina Kurd û Selçûqiyan (Tirk) re gelek mirov li bakûrê Kurdistanê û sînorên dewleta Merwaniyan gihîştin hev. Bi pâşengiya Alparslan, ew hêzên wir bi tanzîm bûn li dijî împaratoriya Bîzans a ku wek astengiya tenê li ber xelkên ji rojhilat hatibûn mabû û ji bo êrîsa ser wê amade bûn. Torî dibêje,

di 1064 an de bi leşkerekî mezin ji Xorasan hate Ezerbeycanê. Di 1070 an de arteşa rojhilat giş, artöşa Kurdên li Hemedan û peşengen li Anadolê komkirin û şer kir.(38) Ji vê dîtine jî xuyaye ku wî hêzên Kurdan bi temamı kom kirine. Di şere sala 1071 an pêk hatî de, Alparslan ji gelek hêzên Kurd jî sûdvvergirt û di şer de biserket. Piştî vî şerî êdî deriyên Anadolê bi temamı ji Tirkan re vebün. Alparslan, piştî serkeftina mezin a 1071 an dibêje: Edî deşt û zozanên Anadolê yên fireh li benda we ne. Cîhên ku we

zept kir ji we re bimîne, kê kuder heyna bila li wir bicîh bibe.<17f>3) Lê ew Kurdên ku di dema Ebasiyan de hatibim, berî Selçûqî biherikin nava Anadolê, li gelek deveran bi cîh bûbûn. Nivîskarê Bîzansî Mikaîl Psellos li ser şere 1071 an ya di navbera Romanos Diyogenos û Alpaslan de pirtûkeka bi navê "Chronographie" nivîsiye. Di wir de ji bo Alpaslan dibêje ew ji koka Parta ye û di çend deveran de jî dibêje siltanê Kurtom Vasileûs (Kurda).(49) Eger ew îddea rast be, Tirk bûyina Alparslan jî dikeve şikê. Ji bilî vê eşkere dibe, ku piraniya leşkeran Kurd in û ji bo vê jî dibêje siltanê Kurdan. Eger ji koka Parta be çawa Anadol kete ber destên Tirkan? Çawa zimanê farisî û kurdî qedexe kirin û di şûna wan de tirkî kirin praktîkê? Ev pirs û xal jî li bersivê diğerin.

Bi şere Malazgîrê re, Oxûz/Tirkmenê hatibim, yan jî hatibûn neqilkirina rojhilatê Anadolê, ji ber pêdiviyan li sînorên Bîzans, li Kîlîkya hatin bi cîh kirin. Wek parêzvanê sînorên Selçûqiyên Anadolê li rojava diparastin; ku Germiyan, Eşref, Hamîd, Menteş ji wan bûn. Li Kîlîkya, yanî li sînorê mîrîtiya Ermanan jî Qeremanî bi cîh kirin.(3M) Gor îddea pirtûkên YVeşana Zamanê li ser dîrokê: Rêdiviya dewletê bi cîh kirinê hebû; Mumkune ku ew bi daxwaza xwe li nav sînorên ku herdû dewlet jî nikaribûn mudaxele bikin bi cîh bûn. Yan jî cîhên çiyayî yên ku ti dewlet nikaribû erîş bike. Cîh guhartina Germiyan jî balkêfe, yan ji tirsan yan jî bi daxwaza xwe ji Meletî çûn dora Kütahya. Kon/federasyon êla yên din jî bi vî rengî cîh guhartin. Dema avabûna dewleta Selçûqî, yanî di sedsala XI an de grubên Tirkmenan zêdetir koçî Iran û Ezerbeycanê kirin. Ew nîv koçberbûn û ji bo ku di nava dewletê de tevlîheviyan çênekin dewletê ew ajotin sînoran; bi vî awayî fetîhkirina Anatolê û Sûriyê li ser bingehekî saxlem rûnişt.(82) Ew dîtin zêde ne maqûle, lewra Tirkmen-Kurd jixwe li Ezerbeycan û Iranê hebûn. Mînaka herî baş jî Şadî ne ku wê demê wek dewleteka girêdayî Selçûqiyan dijî. Lê, di vê vegerê de sedema bingehî li

gor dîtina min zextên li ser Kurdane û şiyarbûna Kurda ye ku ew gihîştin vê qeneatê ku dewletê wana bikar tîne. Ew yeka di praktîkê de divê pêk hatibe; yanê Alpaslan û berdewamiya wî li ser soza xwe nesekinîn û cîhên ku Kurdan fetîh kirin dîsa ji dest wan girtin; bi ser vê de jî Kurd vegeriyan cîhên xwe yên berê yên li navenda Xorasan û Arranê... Çûyineka bi vî rengî yê di demên paş de jî pêk te. Piştî avabûn û firehbûna Osmaniyan, Kurdên li Anadolê mirîtî yan jî dewlet avakirin, li hember ê^ên Osmaniyan nesekinîn û vegeriyan îranê; emê li pêş li ser rawestin. Selçûqiyan ne ku ji bo êlên Kurdên koçberbûn û di nava dewletê de tevlîheviye nekin ajotin sînoran. Wê demê hîn dewlet yan jî

sîstemeka Osmaniyan xirab bibe li hole tune. Sedema heri maqûl ew bû, ku ew êl van jî federasyonên élan di alî leşken de pir pûşketî, bihêz û bê tirs bûn; di şere gerîlatî de ew hoste bûn, ku Selçûqiyan dixwest bi wan împaratoriya Bîzans ji teqatê bixe. Dîsa di pirtûkên weşanen Zaman de niqteyeka girîng eşkere dibe: Hêzên Selçûqi yen ku Anadol ji xwe re kiribûn war, bi piranî ji Tirkmenan pêk dihatin. Tirkmenên di bin bandora alozî û tevlîheviya siyasî ya di nava Ezerbeycan û İran de mabûn, bi piranî li sînorên Bizans bi cîh dikirin. Piştî 200-300 salan siyaseta Osmaniyan li ser wan: sazûmana wan parce kirin, bikin grubên bicûk û girêdayî axé kirin bû.<82) Sedema esasî ew e: Bi hêza wran dijmin lawaz bike, erdê bigre; piştre, ji bo ku ew ji Osmaniyan re nebin xeter, x-westin parçe bikin û di nava Tirkan de bihelînin. Ew siyaseta hê jî berdewame. Di hinek cîhan de bi ser ketine jî, lê piraniya Kurdan ew nepejirandin û vegeriyan wrarên xwe yen kevn. Tûfan Gunduz rastiyê tîne ziman: Hukumdarên Selçûqî nerihetiya Tirkmenan dizanin û ji bo wê, wTek tedbîr ew li hemberî hêzên li çiya bi kar dianîn yan jî ew dişandin herêmên pêş ku pê xaka Ermenî, Gurcî û Bîzansan didan talan kirin. Ew polîtîkayeka din a firehkirina xaqa Selçûqî bû. Ji ber vê yekê jî, gelé Bîzans direvî hundur.(115"26) Ji alî gelek

dîroknûs û lêkolînerî ve tê qebûl kirin, ku Selçûqiyan Tirkmenan li gorî dilê xwe bi kar dianîne; ew dişandine ser dijminan, dişandine sînoran, xakê pê zept dida kirin, ew ji rêvebiriya dewletê û derfetên wê bê par dihîştin û di dawiyê de jî ew bi komployekê ji holê radikirine.

Bi hatina Tirk û Kurdên li dervayê welat re Anadol bi piranî kete destê Selçûqî û Kurdan. Li herüber vê, hewldanên Bîzans jî hene ku hemleyeka din bikin û wan hêzana ji axa xwe bavêjin. Ji bo vê gelek şer û tekoşîn di xeta Firat de pêk tên. Vê demê, li hinek cîhên herêmî carna îttîfaqa Kurd, Asûrî, Ermenî û Bîzansiyan pêk tê. Carna jî Kurd dibin dijberê Bîzans û Suryaniyan. Di sala 1098 an de pîskoposê Riha Thoros (du sala berî vê bajar bi fên kir destên xwe lê gelé bajer jê heznedikir) bi 12 kesayatiyên henêmê yen bi nav û deng ve çû cem serleşkere Grekî yê bi navê Baûdoûîn ku bila bajarê wan ji erişen Tirkan biparêze.(20> 12 kesayetî federasyona êlên Reşiyan yen ji 12 élan pêk tên tîne bîra mirov. Ew yeka ne tesedufe û îhfîmaleka pir mezine ku ew kesên çûn serokê êlên Kurd bûn. Ev kesana nûnerên gelé bûne. Xuyayê ku Süryanî bajêr birêva dibin û 12 kes wek heyata îstîşare heye.(20) Wata 12 kesan ev e ku ji her eşîretekû kesek, yan jî ji her qebileyekê serokek e. FFeyeta îstîşare jî mumkune, lewra heta dema derengî di nav gundên Kurdên li Anatoliya Navîn de heyetên rûspiyan hebûn û wek meclisa şâwirmendiya gel kar dikirin. Dema Bozan dibe desthilatdarê Riha ew 12 kesena li dar dixe. Dîsa di navbera Kurd û Suryaniyan de li di jî Tirkan îttîfaqekê heye. Kîlîkya jî di destê Ermeniyan de ye. Dema Boûdoûîn derbasî rojhilatê Firat bû, jêra kemîn hatin danîn, ev li gel Ermeniyan bû mêvan û Kurdan jî tîr davêtin wî. Wek Albertûs nivîsî desthilatdarê Samsat Baldûk e; yê Sûrûçê Belek e û di artêşê de Ermenî, şövalye frank jî hebûn lê têk çûn. Di salên navbera 1098-99 an de hezar kes mirin. Di

sala 1098 an de erîşî ser Samsatê kir û Kurd têk birin. Berî vê jî Kûrboxa (artûşa wî ji Ereb, Tirk û Kurdan pêk dihat) erîşî Riha kir lê têk çû. Mateosê Rihayê ji bo Baldûk dibêje: "Ev kurê Emîr Qazî Baldûklû bû. Gorî jêderên Ermenî yê bi navê Vardan ew kurê Ibn el-Danişmend Emîr Qazî ye. Wek em dizanin ew ji Mirdêsî ya ye. Ew êla hanê niha beşekî li Anatoliya Navîn e.

Li rojavayê Anadolê, bi taybet jî li bajarê Afyon hîna jî şopa Tirkmen-Oxûzan heye; kevirên goristanên neqişkirî û gelek belgên din vê didin îspatkirin. Bi taybet jî, li xeta ku ew jê hatine mirov dikare ji wan kerwanan bibîne. Ji Arranê bigre heta Meletivê û ji wir jî heta Afyonê ew xet dom dike. Li aliyê din jî heman reng li Loristanê li herêma Bextiyariyan tê dîtin.

Êlên Tirkmenên li Afyonê

Wekî me li jor jî gote, berî Selçûqiyan, Kurdên ku wek Tirkmen dihatine bi navkirin li rojavayê Anadolê belav bûn û gelek dewlet avakirin. Dîroka fermî ya dewleta Tirk li wan xwedî derdikeve, lê rastî ne wiha ye. Ji wan dewletana ya heri bi nav û deng Germiyan bû. Vana xwe li rojavayê Anadolê (Kütahya) bi rêxistin kirin lê pa§ê ji alî Osmaniyan ve ji holê rabûn. Kurdên dest fireh, xaka dew'letê wek qelen pê§kê§ê Osmaniyan kirin. Heta sedsala dawî li Afyonê hîna jî Kurd hebûn. Gelek ji wan vegerin Kurdistanê û beşek jî li Anadola Navîn bi cîh bûn. Yên ku man jî heliyan. Hinek Kurdên li wir wek: Cerîd, Danişmend, Herdîlî, Qerekeçî, Kikan, Kizil Şêx/ Mihaîlî, Alikan, Bayat, Bozûlûs, Taban, Çakalan, Germeyan, Kaçar, Qaracakurd, Kurdmihmad, Kutuklu Afşar, Okçû, Sêvik, Şereflî Tirkmanî-Şereflî Kurdu û Zir-Zer o^ı-s/12) an rg7 dibin û hema hema piraniya wan li Navenda Anadolê ne. Piraniya wan hîna bi van navên xwe dijîn. Nivîskarê wan rêzana bixwe ji êla Sêvikî ye ku li jor navê xwe heye.

Gor texmîna min Kurd li vê heiêmê gelek sedsalan man; ew yeka ji kevirên goristanan jî tê zanîn, yên dawî jî di dema Yawûz de reviyan. Kurdên ku li wan gund û bajarokan bi cîh bûbûn şopa xwe jî hîştin. Heta hê jî di alî çand û kevneşopiyan de bandora wan berdewam dike. Wekî nivîskar jî diyar dike kevneşopiya wan cüda bûye: Li gundên Buyuk Qerebax, Qereyokûş û Yoruk Qaracaoren a girêdayî Bolvadînê merasîma meyitan ya xistina goran, ne gorî edetên Islamê ye, cüda ye. Li vê herêmê êlên mîna Avşar û Qerekeçî desthilatdar bûne û merasimên wan mîna yên Asya Navîn bûye. Termê mirov hate veşartin bi şûnde, di dora gorê bi hespan yan jî peya 7 caran dizivirin û heta sedsala XX an, bi qasî dijminên ku kuştine li dora gotê kevir dihatine danîn. Navê wan keviran balbal bû ye û ji bo wan kilamên şînû dihatine strîn.

Wek mînak:

Kürdün dewelerî gîder geç gelîr Oxun oxun karnim aç gelîr- Eller anam dedîkçe bana guç gelîr Geldî goynexîme girdî ayrilik

Kevirên gorên li Kütahya yê

Tê îddea kirin ku di dawiya sedsala XI an de Anatoliya Navîn derbasî kontrola Tirkan bû; bi vê yekê re bajarê Qonya bû navendeka siyasî ya girîng. Qonya berê bû payîtexta Selçûqiyên Anadolê (1U97-12Ü8) û paşe jî bû payîtextê Qeremanan (1327-1476). Qeremanî Kurd in û hîna jî bi vî navê êlên koçber li Xorsanê hene û min ew ziyaret kirin. Di Kurd bûyin û sersortiya wan de ti gu man nînin û êleka pir şer van e; hîna jî kevnoşopiyen kurdî d idomînin. Di na va sedsala XIII an de Qonya bû cîhê şere Turkmen û Moxolan. Ji dawiya sedsala XIV an heta dawiya sedsala XV an Qonya bû dhe şere Osmanî û Qeremaniyan. Ji sala 1483 an bi şûnde Qeremanî têk çûn.,1U 9) Wekî tê diyarkirin Qeremanên şervan heta dawî

li berxwedane. F. Sumer xelekaka girîng dinivîsîne: Di sedsala XII an de li Xorasanê dema digotin Diyarı Rûm (Anadol) Tirkmenên li navbera Qonya û Enqereyê de dijiyan dihate bîra mirovan.1131158) Ew jî dide xuyakirin ku wê demê jî Kurd li Xorasan mane û Kurd ji sedsala XII an ve li herêma Anadola Navîn bi cîh bûne. Lê mirov eger bi vê coğrafya yê bi sînor neke hîn rasttir e. Lewra Kurd ji Îzmîiê, Antalyayê heta Marmarayê bi cîh bûbûn. Yek ji îspatên vê defterên Osmaniyan yen kevn in, di van de gundên bi navê êlên Kurd û navên kurdî hene. Dîsa kevirên bi nivîs û wenê jîîspata van in.

Lê, kîngê Tirk bi hêz bûn, xwe wek dewlet bi rêxistin kirin û hêza îslamê ya fetîhkirinê jî dan pişta xwe, peşî xaçperest ji holê rakirin. Piştre jî vegerîn ser Kurdan; ji aliyekê ve ew li dijîhev bikar anîn, ji aliyekî ve jî bi xwe yek bi yek dewlet û mîrîtiyên Kurdan ji holê rakirin. Li ser vê Kocadax ji dîroka Wanê wiha radigihîne: ...Ela Cibranî ya girêdayî Milan di sedsala X an de li Teke (Antalya) rûdinişştin, ji vir ji Riha yê re hatin şandın, ji wir jî çûn VVîranşehîr e. Piştî wê di pûşengiya axayê êla Şexsiwar de çûn Varto, Bûlanik û Karliovayê.07" 193) Dîsa ji bo êla bi navê Etmankî tê gotin ku ew êla berê li bakûr û bakûiê rojhilatê Derya Kesk dijîn û ji demekî pir kevn ew hatina dora Silêmaniyê; ji wir jî beşekî bi riya Midyat, Stewr, Mêrdîn, Amed û Qulpê çûne Bedlîs û

Araratê. Hinek ji wan li dora Bediîse diminin ji ber ku Ga yen wan westiyane ji wan re gotine "Gawestiyan". Beşek jî diçin Qastamonû û Antakya.(17198) îro li Kirşehîre gundên Etmanan hene û li gundên Cîhanbeyliyê ji Canbegan re dibêjin Gawestî. Géra wan ê di pêvajoya dîrokê de jî hema hema vê yekê piştrast dike.

Gundiyekî Etmankî / Etmana / Kirşehir

Dîtina ku dibêje piraniya êlên Dêrsîmê di sala 1300 an de bi cîh bûbûn jî raste. Lewra bicîh kirina Kurdan bi sedsalan ajot û xuya ye ku Kurd qor bi qor anîne û li cîhên cüda bi cîh kirine. Hinekan jî xwe ji ber zilma dijminan avêtine çiyayên Dêrsîmê. Wê deme êlên hatibûn ev in: Şe\ Hesenan, Kûreyşan, Hormek, îzol, Şeydan, Karsan, Milan û Bamasûr in.(ll6"18, Heta sedsala XVI an li Dêrsîmê êlên mîna: Yîva, Axaçerî, Çavûndûr, Doxer, Çepnî û Eymûr cîh girtin. Dîsa di vê demê de Bozûlûs ji zozanên Dêrsîmê îstîfade dikir.(116'22) Di navbera salên 1804-1813 an de jî Rûsan ji bilî axayê Kurdên Êzdî Hesen û Kurdên girêdavî wan, yên din birin meydana şer û bakûrê Qefqasya; ew pa§ê hatin Anatoliya Navîn..(28) Ş. Firat jî dibêje: Êlên Kurd mîna: Hormek, Hiran, Qoçgirî, îzol, Karsan, Şadı, Arili, Alan, Demenan ji Xorasanê hatin û xwe avêtin bextê çiyayên Dêrsîmê. Ew rastiya di secera ku Alaettîn Keykûbat de

ye; bavekî Elewiyan yê bi navê Dervvîş Beyaz de hatiye nivîsîn.{127'28) Heman nivîskar belgeyeka girîng jî peşkeş dike: Li gundê Sarikê yê girêdayî Gimgimê secereyeka ku di sala 1186 an de hatiye nivısîn d erkete hole. Ew seçere di sala 1232 an de ji alî Alaettîn Keykûbat ve hatiye pejirandin. Ew gelek dirêje. Lê di wir de tê nivîsîn ku 12 êl ji Xorasan batine Ezinganê, Baxin-Qerekoçan û Semsûrê. Serokên wan jî xelîfên Elewiyan Seyyid Mehmûd-Hayranî yê Xora- sanî û Şax Mensûr Baba hebûn.(127"76) Ew êl wiha têne rêz kirin:

1. Hormek (Baliyan): Eeqaba wan Begên Hurem in û serokê xwe Cafer-Delîsîn
2. Alan: Burkent û serokê xwe jî Teymûr e.
3. Ba-Ilyas: Huseyn serok e.
4. Milan: Muhammet.
5. îzol: Abdullah.

6. Haydar: Leqab Qerevel e û serokê xwe Elî ye.
7. Karsan: Leqab Şaz e û serokê xwe Mûstafa ye.
8. Lal: Leqab Yuruk Uzûn û Ibrâhîm e serok.
9. Çakir Tahîr: Mehmûd.
10. Dada: Muhammed.
11. Zor Weliyan: Yûsûf.
12. Merdîs: Külah Dîk û Ebas e serokê xwe.,1Z7'78)

Ew ên îro jî li alî Pîranê, girêdayî wan bavan jiyana xwe dom dikin: Izol, Heyderan, Karsan, Şahweliyan, Arîlî, Şadî, Milan û li mile din jî Hormek û Hiranê ji du bira ne. Ji jêderên dîrokî tê fêhm kirin ku Selçûqiyan rûyên xwe rind bi êlên ji Xorasanê hatine re nîşan dane û ji wan gelek sûd wergirtine. Li hember Moxolan bi kar anîne û yen mane jî reviyane çiyayên Dêrsîmê.(127 æ)

Herçiqas Selçûqiyan Kurd şandine ser dijmin, bi wan cîh girtine û ji wan îstîfade kiribin jî, xuyaye ku ji wan gelek ji tirsiyane. Piştî dewleta xwe bihêz kirin bi şûnde baş dîtin ku Kurd nakevin nava destên wan û kontrola li ser wan gelek dijwar e. Ji aliyê din ve miletekî pir şervan bû. Ji bo vê tê gotin; ku pirsgirêka Selçûqiyan a mezin û herî dijwar pirsa "Tirkmenan" bû. Beşek ji wan, ji ber Ibrâhîm Yenalê ku bajarê Rêy dagirki rî reviyan û çûn Ezerbeycanê.189' S) Li vir jî derdikeve holê ku bajarê Rêy berê di destê Kurdan de bûye. Ew Kurdan nedixwestin têkevin bin desthilatdariya Selçûqiyan. Lê Tûxrûl Beg ewna dan anîn û dixwest ewana li hember rojava bikar bîne. Tirkmenan mezinatiya Siltan qebûl kirin lê daxwaza beşdarîbûna seferan qebûl nekirin. Serokên wan got: eger ti zore bidî ser me, emê herin Anadol û Sûriye. Paşe bi rastî jî ew kirin û Mûsil bi bakûrê Mezopotamya ve dagir kirin. Di dema Melîk Şah de (1072-1092) apê wî Kavûrt pişta xwe da Tirkmenan û îddea xwe ji bo text

ji dest dice peşxist.(89'8) Qasî Selçûqiyan dixwest ji hêza eskeriya Kurdan îstîfade bikin, Kurdên desthüatdar jî ew yeka dikirin:

Yek ji wan desthilatdaran jî Imadeded-dîn Zengî yê Kurd bû. Wî, ji Yiwa yen li Kurdistanê (Şehrîzore) bi hejmareka mezin dijîn birek bir bakûrê Sûriyê

sînorê Xeçperestan û war da wan. Serokê wan Yarûk bû. Yiwa yen li Kurdistan mabûn jî, di rêberiya Berçemogûllari de heta dema Moxolan man. Koma heri mezin a li Anadolê, sînorê Bîzans bû, hinek jî di geliyên tenha de bûn.(131'132/152) Wekî berê jî me gotibû; ew ji dora Seyhûnê hatibûn. Dema Celaleddîn Harîzm- Şah hate Ezerbeycanê (1225), li Arran Tirkmen gelek zêde bûn; ji bo piraniya wan nîşan bide gotibû "keriyên meriyan", rêbertiya wan Emîr Husam Kiliç Arslan dikir, dema Moxol hatin ew Tirkmenena ji vir derxistin.(131155>

Selçûqiyên Asya Biçûk gava Mîrnîşîna Danişmendî ya cîranê xwe di sala 1180 an de ji holê rakirin, Riha jî heynan û dixwestin bigihîjin Gurcîstanê. Lê ew daxwaza nîvçê ma û nikarîn. Her çikas nikaribin herin Gurcîstanê jî deriyê Kurdistanê ji wan ra vebû bû. Di dema Alpaslan de, Saltûka Erzirûm; Mengûca Ezingan; Danişmenda Sêwas; Afşîna Antalya; Kutalmişoglû ji Anadol ji Bizansiyan paqij kirin. Di 30 salan de Bizansiyan ti li berxwe nedan. Li hember vê hêzên herêmî, li Erzirûm, Sêwas, Meletî, Wan, Qeyseriyê li berxwe dabin jî, Selçûqiyan ew têk birin.(,7) Hezên herêmî yên ku tên qal kirin Kurdên nişteclh in û beşekî mezin jî xwedî mirîtî bûn. Heta du cara xwestin Amedê ji destê Merwaniyan jî bigirin lê nikaribûn. Tiştû balkê§ eve, ku li gorî V.A. Gordlevskî, da nav leşkeren Selçûqiyan yên digihîştin 250 hezarî de Kurd jî hebûne. Gor texmîna min di nava wan de Kurmancên bakûrê nişteclh tunin, lewra ew xwedî mirîtî bûn. Beşek ji Kurdên li dervayê welat ji sedî sed e; îhtîmaleka din ê mezin

jî Kurdên Lerî-Şûxbizinî û hinek Dimilî di nava wan de hebûn ku ew kombinezona Kurdên li dervayê Welat e.

Di dema Keykûbat de jî Selçûqiyan hewl dan ku têkevin nava Kurdistanê, lê nikaribûn ji xeta Mereş, Meletî û Sêwasê derbas bibin. Wê demê li herêmên mîna Riha, Harran, Axlatê, Eşrefûn Eyûbiyan desthilatdar in. Li Mêrdîn, Xarpût û Amedê jî milên Artûkogûllari desthilatdar in. Dîsa li Kolik, Semsûr, Çemişkezekû jî Artûkogûllari desthilatdar in û bi alîkariya Eyûbiyan li ser piyane. Dema ku Keykûbat êrî§ kir di navbera Artûkogûllari û Eyûbiyan da îttîfaqek tê xuyakirin. Her çiqas îttîfaq kiribin jî, li ber artêşa Selçûqiyan ranawestin, têk çûn û bajarê mîna, Kolik, Semsûr û Çemi§kezekê derbasî (1127) Selçûqiyan dibin. Dema li vê dijberiya bi kûrahî dinihêrî, ev pirsa tê bîra mirov: Gelo ew çawa ji Kurdistanê derbasbûn û hatin rojavayê Anadolê? Ihtîmala yekemîn ewe, ku Selçûqiyên-Tirk ji valahiya di navbera mîrîtiyên Kurdan îstîfade kir û hatin. Ya din, dema pişgiriya Alparslan kirin li ser vê peymanek çêkirin, ku Selçûqî dê dest navêjin mîrîtiyên Kurd û ew jî rê bidin wana. Ya sêyemîn jî Kurdên di nava Selçûqiyan de, ji Arran û navenda Xorasanê hatibûn ew riya ji wan re vekirin. Piştî ew li rojava bicîh bûn, êdî dest avêtin mîrîtiyên Kurdên li rojava û Kurdistanê. Di heman demê de 16 melîkên Eyûbiyan bi Artûkiyên Mêrdîn û Xarpûtê ve îttîfaq kirin û çûn ser Selçûqiyan. Artûşa Selçûqî ji Rûs, Gurcî, Frenk û ji lê§kerên Herîzm pêk dihat. Di şere derketî de koalisyona Eyûbiyan têk çû û Xarpût kete destê Selçûqiyan û Artûkî ji holê rabûn. Artâşa Eyûbiyan vegerî Misrê. Herîzmên di nav Selçûqiyan de

jî veqetîn, ji Firat derbas bûn û her der talan kirin. Meletî û Xarpûtiyên di bin fermandariya Selçûqiyan de her çiqas xwestibin li dij derkevin jî nikaribûn û têk çûn. Herîzmê xwîn xvvar Riha, Harran, Heleb û der dorên

wir serûbin kir û riyênbazirganiyê girtin. Bi ser vê de Eyûbî yen Helebê bi Selçûqiyan re hevkarî kirin û Herîzm têk birin.

Heta vir me hewl da destnîşan bikin; ku Tirkmen, Oxûz û beşek ji Selçûqiyan Kurd in û me gelek mînak û bûyer nişan dan. Prof. Marr jî dîtinen me bi awayekî din dipejirîne: Di dema Selçûqiyan de Kurd û Tirkmen di alî biyolojik de gelek tev hev bûn. Heta, Tirkên ku îro li Anadolê dijîn di alî etnîkî û çandî de di bin bandora Kurdan de man; dibêje. Ew ji bingeha Tirk- bûyina Tirkmenan têza xwe ava dike, lê di bingeh de heman gel e. Rastiyeka din jî heye ku fîzîka Tirkên îro li Anadolê bi yên li Asya Navîn ve yan jî bi Tirkên xas ve hevûdû nagre. Gelek Tirk di alî fîzîkî de nêzîkî Kurdan bûne. Eğer mirov bibêje: Gelo miletekî Tirk bi rastî jî heye? Mate me ye...

Têkçûna Selçûqiyan

Birêz Kocadax dibêje: Bi hilweşandina Selçûqiyên mezin re paralel, li rojhilat Harîzmşah bi hêz bûn. Elên koçber ên ku wê demê li Asya Navîn, Türkistan û Afganîstanê bûn berbi rojava û Anadolê çûn. Kalên êla Baranliya îro li Ezinganê rûdinên yên bi navên Yazir û Yabgû çûn Ezingan û Helebê. (17'66) Navê wê yê rastî Beranî ye; balkê§e ku ew bi navê Yazir û Yabgû tenê xwendin ku paşe ew dewleta bi navê Qerekoyûnî damezîrînin. Dîsa me di beşa saxên Oxûzan de navê Yazgir jî nivîsî bû. Tê wê watê ku Yazgir Beraniyên Kurd in! Di Kurdbûyîna Oxûzan de ti gumana min nîne, vvekî min berê jî gotibû di herikandina pirtûkê de emê hewl bidin ku vê yekê îspat bikin. Yek ji 22/24 komên girêdayî Oxûzan jî Yazgir e û derdikeve holê ku ew Beranî ne. Heman nivîskar dibêje: Yîva çûn nava Anadolê/17'66) Gelek caran jî bi navê Yiwa, îwa, Yva tên nasîn. Texmîn dikim ku ew konfederasyoneka élan e, lê navê wê hîna jî sira xwe didomîne. Ihtîmaleka pir mezine ku ji Reşî yan jî Sêxbizinan yek bin. Di berdewamiya vê de dibêje: Eftalîtê (Haytal) yan jî Abdallanê ji Akhûnan li

rojhilat, rojava û nava Anadolê li cîhên cûda bicîh bûn. Tirkmenên Begdîlî, Avşar û Qerehitayê ji ber Moxolan direvîn û êlên din ên ku ewlekariya xwe nemabûn welatê xwe terk kirin û çûn Anadolê.(17‘66) Navê Akhûn dîsa derdikeve pêşberî me û di vir de wek Kurdan tên xuyakirin. Gor texmîna min ew Kurdên Lek-Lor ên li Anadolê û Kurdistana mezin in.

Selçûqiyên Anadolê, bi zora ïlxaniyan belav bûn û hêdî hêdî mîrîtiyên Tirkmen ên serbixwe û nîvserbixwe derketin holê.{82) Di vir de mebesta wî mîrîtiyên Kurd in. Lê belavbûn ne tenê ji ber zexta ïlxaniyan e; wekî me gotibû Selçûqiyan di rêvebiriyê de û di leçkeriyê de cîh nedidan Kurdan; yanê Kurd tevlî dewletê nekirin, ji ber vê jî Kurd tim û tim li hember dewletê di nava tekosînekê de bûn, vê yekê jî hêza dewletê kêm kir û hundirê wê vala kir. ji

derve jî zextên Moxolan ew birin belav kirinê. Di wir de sedema herî girîng rola dewletê ya li hember Kurdan e. Dewleta bi hêza Kurdan avabûyî: bi wan re rêveberî û hatina dewletê parve nekir û bi çavên dijminan lê mêzekir. Ji hêzeka mezin û şervanen mina Kurdan re dijminatî wê dewletê gavekê bi pûşve nabe. Ew yeka ji bo roja îro jî derbas dibe. Dewleta ku Kurd nede kêleka xwe dê tim û tim wenda bike.

Bi hatina Moxolan re, Kurdan dîsa cîhê xwe bi piranî guhartin, lê welatê xwe terk nekirin. Hêza yekemin a li hember Moxolan rawestiya û têkoşiya Kurd in. Pirtûka VVeşanûn Zaman vê yekê wiha şirove dike: Ji ber tirsa Moxolan, Tirkmenên li rojhilat û navenda Anadolê dijîn bi hejmarek gelek zêde berbi rojava, Derya Reş, Qastamonû û herêmên çiyayî yên li Antalya komî ser hev bûn. Li ba wan gelek §êx, pîr û baba hebûn. Ji bo wê li rojava (Anadol) ocax hene. Ew ji tevlîheviya rewşa siyasî ya Bîzansan jî îstîfade kir û wek dewlet xwe bi rêxistin kirin. Qeremanî xwedî li mîrasa Selçûqiyan derketin û di nava mîrîtiyên din de statûyeka bilind wergirtin. Cara ewil ew tirki bi fermî bikar anîn... Di nîv çerxa dawî ya sedsala XIII an

de Germiyan ji Kütahya derketin û heta rojavayê Anadolê firêh bûn. Bi parvakirina xaka dewletê di navbera zarokan de, hêza xwe kêm bûn û komên di nava wan de jî serbixwe bûn.(82) Bi dîtina min ew îddeaka bê bingehe, lewra Qeremanî mîrîtiyeka Kurd e û li dijî Osmaniyan heta dawî şer kiriye. Piştî têkçûn bi piranî çûn Xorasanê û hîna jî li wir dijîn. Hîna jî bi zaravê kurmancî deng dikin û piraniya wan zimanên din jî nizanin. Di be ku berovajiya vê dîtine rast be; yanê Qeremaniyan tirkî qedexe kiribin.

Dewleta Selçûqî wekî tê mezinkirin nebû; li hember Moxolan ti îrade û tekoşîn nîşan nedan û reviyan. Kralên dewletê rêvîn û paşâ jî mecbûrî bac dayina Moxolan bûn. Li hember Kurdan jî pişta xwe dan Moxol û hêzên der¬ve. Lê wekî me li jor jî gotibû, Kurd heta dawî li hember Moxolan rawestiyan û ew bû sedem ku Kurdan xwe bi rêxistin kirin û ne fireh be jî yekîtiyên xwe yên konfederatîf pêk anîn.

Ol

Bêrî Kurdên ji heiêma navenda Xorasanê bên ew di bin bandora Zerdeştiyû de bûn; bi şeren misilmanan re beşekî mezin ji wan ola Islamê pejirandin. Lê ew bi zorê bûbû û Kurdan gelek sedsalan ji dil bawerî bi vî olê neanîn. Ola xwe ya kevn, bi rengê misilmantiyê boyax kirin, lê di praktîkê de wek berê dijiyan û di jiyana civakî de giraniya ola kevn hebû. Ew yeka hîna jî heye... Bi taybetî jî dema hatin Anadolê, di bin navê terîqetan de baweriva xwe meşandin û xwestin wê belav bikin. Ew yeka di dema Selçûqiyan de gelek belav bûbû û carna jî dibû sedema alozî û serhildanên mezin. Elên ji Xorasan hatibûn bi xelîfeyekî terîqetê ve hatin û rêbertiya wan di sala 1212 an de ji alî Alaettîn Keykûbatê Selçûqî ve hatiye pejirandin. Alaettîn secereyan da wan û

di wan secereyan de mafê xulamtiya élan daye wan xelîfeyan.127-231 Rêvebirên dewletê jî xwe tevlî baweriya wan nedikirin û ji bo wan di

dereca yekemin de girtina erdê girîng bû û hê Tirk bi xwe jî bi temamı nebûbûn misilman.

Lê dema Kurd hatin, ola xwe di bin navê Alavî/Elewîtî de kamûfle kiribun. Vekirî nêdiwêribûn, lê bi navêîmam Eli dikaribûn bi serbesti baweriya xwe bimeşînin. Her çiqas Selçûqiyan têya sunnîtiyê dişopandin jî, zêde hêza wan tunebû ku ji bo ol seribaniyan bigerînin. Di sedsala XIII an de di cîhên ku Kurd lê dijîn ocax û dergahên girêdayî Elewîtî û Bektaşîtî de tim ayînên olî dibûn. Di dewleta Selçûqî de jî kanûnê ola îslamê "Mİsilmantiya Sünnî" derbas dibûn. Selçûqî di alî şaristaniye de gelek paşta bun. Gelek tişt ji mele û derweşen Kurd fer bûn. Derweşan di alî yekîtî bûnê de jî roi lîstin. Evên ku ji Ezerbeycan, Hewlêr yan jî ji rojhilatê Kurdistanê dihatin xelk ji bo Moxolan jî hişyar dikirin. Gordlevskî îşarete pê dike, ku Selçûqiyan di wextê xwe de bi şev ji tirsa erîşen koçeran, derî û derwazên bajaran qayim dikirin...061

Di serdema Selçûqiyan de, li hember dewletê serhildana herî mezin jî bi rêxistina olî pêk hat. Vê tevgerê hema hema dewlet têk biribû, lê bi alîkariya ji derve, Selçûqiyan xwe di kêlka dawî de rizgar kirin. Rebêrê vê serhildanê Bav Isheq; li mintiqa Keserfûn a girêdayî Samsatê hatibû dinyayê. Isheq li gundê xwe diçe ber golikan û bi nane zikê kar dike. Bi xwe Kurd e.<39) Navê xwe yê esil Ebûl Beka bû, ji Xorasanê hate Anadolê û kete terîqeta Baba Ilyas.,,09 î)Mirîdên Bav Isheq Tirkmenan, ji wî re digotin "Bav Resûl" yanî resûllah ku ew jî li dijî qeîdên misilmantiyê bû.(112-81 Gelek mirîdê wî çêdibin û herêmên mîna Samsat, Kefersûnd, Semsûrê ku Kurd lê dijîn di sala 1240 an de dest bi serhildanê kir û berbi Meletî ve çûn. Slogana wî: "Dinya malê hemû mirovatiyê ye, ev kedxwarî çima?" bû, yanî li dijî zilm û kedxwariya Selçûqiyan ya li Kurdistanê dest bi serhildanê kir.{391 Me berê jî qala serhildanên bi vî rengî kiribû ku piraniya wan li Xorasan û coğrafya Kurdan derketibûn. Bi taybetî jî

dirûşma Xûrremîtan (Sûrhalaman) jî ew bû û ew jî îspateke, ku ew ji heman kevneşopiyan û nijadî tenê. Vê kevneşopiye li Anadolê jî dom dikir.

Lê ser Bav Isheq jî ramanên cûda hene: di hinek belgeyan de Baba Isheq-î Xaricî, hinekan de Isheqî Şamî yan jî Bav Isheq e. Di cewherê xwe de hemû rast in. Ji bo ku serhildêr e û li dervayê sîstema misilmanan e ji wan re Xaricî dihate gotin; ji bo ku ji alî Şarrm hatine, hê êl bi vî navî jî li Xorasanê heye, ew Şamî ye. Di vê serdemê de, elên nişteçîh û Tirkmenên hatibûn di hewldana rûniştandinâ de bûn. Giyasettin Keyhusrev II an wek serokê Selçûqiyên Anadolê li Qonya di nav kêf û sefa de dijî. Xelk jî belangaz û perişan û di tdkoşîna serkeftina olên (Zerdeştî, Manîzm, Xiristiyanî) xwe de bûn. Islam jî bi pêçdiket û bi desthilatdariya xwe bi muxalifan re ketibû tekoşînâ. Bav Isheq ji dora bajarê Silêmanî hate Semsûrê. Bi dîtina min ew berê li dora Şamd bû, piştre hate bakûr. Li gundê Keferdizê bi cîh dibe. Li Iranê, ji alimê Ismaîlî Alaaddîn Muhammed perwerda olî dibîne. Paşe tê Yozgatê û dikeve terîqeta Bav îlyas, ku Bav Ilyas, li 1200 ji Xorasan hate Amasya û li wir ocax avakir û li terîqeta

Babiyîtî belav dikir.(10,‘ni) Baweriya wî qezenc dike şûnde, wek xelîfê serekî tê Semsûrê. Mirovekî zana û xatib bû. Di demeka kurt de navê xwe belav dibe û xelk dibêje ew xwedî keramete û tên dora wî dicivin. Girêdana xwe bi peyva "bavik" dianîn ziman.(85'49) Piraniya mirîdên wî Kurd bûn, xaçperest jî hebûn. Di alî baweriya Babaiyan de zelalî tune, lê Prof. Cahen dibêje: Ji dervayê Şîîtî û sunitiyê bû. Dîsa heman nivîskar dibêje: Ihtîmaleka mezine ku Germiyanoglû yê li Meletiyê ji Kurd û Tirkmenan pêk dihatiye Êzdî bûn. Ebûl-Ferec jî wek olêkî nû nîşan dide û dibêje: Li dijî îslamê tevgereke pir cüda dest pêkir. D. Avcioglû dibêje: Ev ola di bin bandora olên rojhilatê başûrû Anadolê de bû. Prof. Osman Tûran jî wiha dibêje: Herêma ku ew serhildana lê pêk hatibû Mereş-

Meletî ye. Eger em bala xwe bidin ser ola vê herêmê, emê bibinin; ku misilman, xaçperest, şîiyen fundementalîst (Îsmaîlî), Manî û olên kevn tevhev bûne. Tê gotin ku Hecî Bektaşî Welî jî mirîdekî Baba yê saxlam bûye.(39) Wekî hemû nûser û lêkolîner jî tînin ziman, ew li dijî Islamê bû; lê ne Zerdeştiyeke tam bû jî. Wekî me gotibû, ji ber tirsê di formekî nû de, dikare bibe Ezdîtî, Elewîtî-Sersorî, yan jî tiştekî din... lê ne Zerdeştî, lewra ew rûpala li Xorasanê girtibûn û careka din jî nikarin vekin. Hecî Bektaş jî ji Xorasan hatibû. Wî jî xwest vê hêza di alî siyasî de bi kar bîne û ji derdê gelé re bibe derman.

Siltanê Selçûqî ji giliyan şûnde aı teşe dişîne ser Bav Ilyas û ew jî direve Amasya. Bi ser vê de Bav îsheq gundî, xizan û Tirkmenan li dora xwe dicivîne û di sala 1239 an de serî hildide. Bi doré; Keferdiz, Şemstir, Kahta, Gerger, Meletî, Elbistan wergirt û berê xwe da Sêwasê. Ewder jî girt û berê xwe da Amasya yê. Heta vêder şerûn kirbûn hemû qezenc kirin. Amasya û Tokat jî girtin lê Bav Ilyas mir; xelk bi hêrs bû û berê xwe da Qonya. Siltan reviya. Siltan ji Rûm, Gurcî, Kurd û Tirkan esker şandin ser Isheq. Leşkeren Rûmê bi zirxbûn û ji ber vê Bav îsheq li Kirşehîrû têk çû û hate kuştin.(85 49)

Di dema Osmaniyan de Tirkmen / Oxûz

Ji çend nûserên Tirk ên ku ji arşîva Osmaniyan sûd wergirtine yek jî bave dîroka Tirk C. Turkay e û li ser êlên Kurd lêkolîn kirine û pirtûk nivîsîne. Di pirtûka xwe ya heft hezar êl di navê de niqteyeka balkûş tîne ziman: Ela Kayî ya ku dewleta Osmanî damezirandiye ji Tirkmenên Oxûzan bû. Welatê Tirkan Asya Navîn e. Lê di nava Tirkên wir de ji alî şaristanî, jiyan û zaravan de cûdahî hene. Ew zarava Tirkan ji hev cüda dikin. Gor vê Tirk wiha beş dibin: Oxûz, Uygûr, Karlûk û Kalaç in. Di nava Tirkan de, Oxûzên ku Iran û Hindîstan îstîla kiribûn, Anadolê dagir kirin û tê de împaratoriya Tirkan avakirin jî hebûn. Lewra di vê pirtûkê de, êlên me nivîsîn hema

hema hemû Oxûz in.ll6010) Dema min li ser vê pirtûkê kar kir, dît ku piranî élan Kurd in. Tenê, hinek êlên Moxol kiribûn nava wan. Ji bo wê di bingeh de êla Kayî ya ku dewleta Osmanî avakiribû, îhtîmaleka pir mezine, ne Tirk in. Li ser vê yekê, Tanerî ji Ord. Prof. Z.V Togan rastiyekê radigihîne: Mirov bêje: Osmanî ji

koka êleka Oxûzan e zêde ye û Osmaniyan zêde bi Moxolan ve giredide. Prof. Wîttek jî: îddea ku Osmanî ji êla Kayî ne bi şüphe lê dinêre.(89) Ew nivîskarana di şüphen xwe de mafdar in. Lewra ew teoriya bi temamı li ser ne rastiyê hatiye avakirin. Kayî yen ku li Iznîkê dewlet avakiribûn kalên beşek ji Kurdên îro li dervayê welat in. Pişt re ji alî Tirkan ve hatine belav kirin û helandin.

Tê îddea kirin ku êla cara yekemin li navenda Anadolê bi cîh bûye Modanli ye; ew êla di sala 1184 an de li Haymanayê bi cîh bûye. Tê gotin ku ew girêdayî Mirdêsiya ne.tl2h'31) Li vê herêmê hîna jî êleka bi vî navî heye, lê ew bi tirki diaxifin û dibêjin em Tirk in. Şikle wan jî mîna koçerên ji Balkanan hatiye, yanê ne wek Kurda ne. Cîranê wan jî gundê Mirdesiyên Kurd in. Dibê ku êla Modanli di vê demê de hate herêmê, ku ew raste û navê xwe da herêmê. Paşê bi êrî§ên Osmaniyan ew dîsa vegeriyan welat, lê navê xwe ma. Êlên Tirkên pişre hatine jî ew nava girtin. Yan jî, êla Tirk di nava Mirdêsivan de li herêmê bi cîh bû. Di belgeyeka di sala 1573 an de tê nivîsîn, ku Ekrad Mûdanli derbasî Haymanê bûne û pêwîste tedbîr bên stendin/126 31) Li rûpelên pêşde ezê di beşa mîrîtiyan de jî qal bikim ku Germiyan û hêzên din di wan satan de Enqerê kirine bin destên xwe...

Bi hatina Kurd û Selçûqiyan û bi têkçûna Melazgir û bi êrî§ên Oxuzan yên gerîlawarî re Bîzans vekişiyan dora Marmara û Stenbolê. Ji vê valahiyê Kurdên koçber îstîfade kirin û hema hema li temamî Anadolê bi cîh bûn. Êla Kinik (di hinek cîhan de jî wek Qayî derbas dibe) ü dora Iznîkê bi cîh bû; Germiyanî li destpêkê li Meletî paşû çûn Kütahya û dora derya Ege;

Qeremanî li dora Qonyayê û yên din jî li Anadolê cîhên cûr be cûr girtin. Tirk îddea dikin ku dewleta Osmanî li ser bingeha êla Kinik ava bûye. Lê berê jî me gotibû ku xanedana Osmanî bi Kinikan re xisimatî kirine. Tê wê watê ku Osmanî bihêz bûn şûnde, Kinik ji hole rakirin û bixwe bûn xwediyê dewletê. Ew yeka gelek caran pêk hatiye. Dewleta Germiyan jî bi vî awayî ji destê Kurdan derketiye û Beyazît li ser rûniştiye. Osmanî hêdî hêdî bi hêz bûn şûnde, dest bi ji holê rakirina mîrîtiyên Kurdan kirin. Berê; Kinik, paşê Germiyan, paşe Qereman û paşê yen din... Lê Kurd li hemû Anadol, Kurdistan û Bakûrê Iranê xwedî dewlet û mîrîtiyan bûn.

Melîk Şah di sala 1106 an de bû siltan. Di vê demê de Imparatorê Bîzans Aleksî Komnenos kelehan li Anadolê çêdikirin û xelk lê bi cîh dikir. Di sala 1116 an de Aleksî bi artûşeka mezin hate Eskîşehîre û li Bolvadînê şer bû. Ti alî serkeftin bi dest nexist. Melîk Şah aştî xwest; lê Tirkmenan ji vê yekê heznekir û birayê wî Mesûdê I an wek siltan îlan kirin. Di şere nav herdû birayan de Melîk Şah têk çû. Di erîşân Tirkmenan yên heta sala 1147 an de şer bi Bîzansiyan re dom dikir. Ji vê tarîxê bi şûnde, Mesûd rihet bû û ji bo ku Tirkmen ji wî re nebin tehdît di salên 1147-1156 an de ew bi cîh kirin. Di lêkolînan de 300 cîhê ku wê demê hatibûn avakirin me tespît kir. Tirkmen 80-100 salan wek nîv-koçer dijîn. Ji kevirê goran heftên xwe di §iklê beranê de ne, ew jî dide xuyakirin ku wan mirovana bi Beranî û Akkoyûniyan ve têkiliya xwe hebûne.

Mümküne ku têkiliya wan ê olî jî hebe.(191_32/33> Ji wê demê de xu ya d ike, ku Tirkan kengê xwe bi hêz dîtine, ya ji bo helandinê Kurd bi cih kirine, yan jî ew ji holê rakirine. Ewên ku li wir bi cîh bûbûn jî peşengen Germiyan in û raste ew Beranî ne. Ew 300 cîhên ku hatibûn tespît kirin jî tenê li dora Afyonê ne. Bi rû vê de gelek cîhên din ên li navenda Anadolê hene ku mirov nikare bihejmêre.

Kürden Zaza jî di sala 1240 an de bi rêberiya Şemsettin Muhammed de dewleteka bi navê "Padîşahiya Gor-istan û Sîstan" avakiribûn.]i vê binemalê heşt padîşahan ew dewleta birêvebirin. Herat, Goristan, Gerecistan, Sîstan, Serbidaran û Memelikîne bû ewên kn dewlet îdare kirin. Ev Dewleta, ji ûrîşûn Cengiz Xan bi şûnde li herêmên Goristan û Sîstanê hate avakirin. Di sala 1371 an de hilweşiya.(59) Dîtinên parelelî vê, ji alî gelek nûseran ve tê parvekirin, ku yek ji w'ana îzady e: Deylemî kalên Zazayên îro li bakûr in. Xanedanên Deylemi yen girîng ev in: Bawandî (665-1349) başûre Xezer; Ziyarî (927-1090) li Tabarîstan û Gûrgan; Kengariyan (916-1090) (Mûsafîrî/Salarî) li bakû rê rojavayê îran; Cestanî (sedsala V1-XII) li Gîlan, Rüyan ûTalîş; Şebînkanî (1008-1119) Kirman û Fars û Kakûyî yen li navenda îranê.(1H105) Rend sal BÎ, kalên Zaza-Dumbeliyên îro yanê Tirkên Part, ji alî Belh d Bexteriyan hatin Iranê; hinek Zaza jî Tirkên Etî ye ku ji sînorê Iranê derketine.(1276) Zaza, ji ber dagirkirina Ereban ji Iranê derketin û çûn çiyayên rojhilat-bakûrê bi lind. Her wiha ji şaristaniye derketin û çûn deren bê dengi12713) Di beşa kalê Kurdan de, me ew babeta vekiribû ku ew nivîskarana jî piştgiriya ditinên min bihêztir dikin.

Memlûkiyan, êlên Tirk û Kurd, bi armanca eskerî li Sûriyê, Libnan û Filistîne bicîh kirin. Ji bilî vê, di sala 1267 an de ji alî Baybarsê I an ve Tirkmen, li hember Xaçperestan vvek muhafiz li keviya peravê hatin bi cîh kirin.(153 7) Kurdên îro li dora bajarê Lazqivê û li çiyayê Elewî dijîn û bi temamî heliyane îhtîmaleka mezine ku wê demê bi cîh bûn. Lewra ew îro tenê dizanin ku ew Kurd in. Wekî din asîmîle bûne. Wekî nivîskar îddea dike, em li vê herêmê rastî Tirkan nehatin, le Kurd hene. Heta malbata serok komarê Sûriyê Esad jî Kurd in û ne dûr e ku ji van Kürdana bin. Ew jî beşekî Reşiyan e. Hebûna Kurdan ya li Sûriyê her caran tê niqaş kirin; Mamoste ismet Şerîf VVanlî li ser vê babetê wiha dinivîsîne: Hebûna

Kurdan ya li Sûriyê heta dema Entîk diçe. Wek mînak li çiyayên Elewî û Bakûrê Libnanê û li dora bajarên Hama, Humus gelek cîhên Kurdan yen eskerî û feodal hebûn. Di çiyayê Elewî ya ku di navbera Humus û Tarsûsê de keleheka Kurdan batiye çêkirin ku niha jî Ereb jê re dibêjin "Hîzan el-Akrad" (Keleha Kurdan). Li ser rêyra Antaqyayê û ji bo parastinê cîhek stratejîk e. Kurd ji dema Selefkiyan (BI 312-64) vir ve le dijîn. Li vê demê êlên Kurdan wek lûşkeren profesyonel û cotkar xizmet kirine.(63)

Gerokê Tirk E. Çelebî dinivîse ku ew çûye Rakka û dora wê û gelé wir hemû Tirkmen in. Piştre em çûn Mereşû û li ser çiyayekî hewzekî heye û ji Mereşe sê seetan dûr e. Di dema kevn de Cemcîm li van zozanan 70 hezar pez, bizin, gamûş û ga yen xwe hebûne. Wana didoşin û şîr berdidin wî hewzî. Ji

wir ew şıra diçû qesra Cemcîma li Mereşe. Li wir li gelé belav dibu. Li wan çiyan û navçeyana bi temamî Tirkmen rûdinên. Ew ji Buhara hatine wir. Ji Maveraûnnehîr bi navê Danişmend, Selçûq, Akkoyûnlû hatine Anadolê û li vir cûda cûda cîh dagirkirine.(96/ni/39> Tenê di navkirinê de ew Tirkmen bi kar tine, ji bili vê binav kirinê, dîtinên wî bêalîne û hin zêde nêzîkî rastiyê ne. Ew niqtên tine ziman jî nişan didin, ku Kurdên ji navenda Xorasanê hatibûn çiqas dewlemend, peşketî û di nava jiyaneka kolektîv de bûne. Ew dewlemendî hemû ji ali Tirkan ve gav bi gav hate xwarin û di dawî de ew Kürdana bûn muhtacê nanê tisi...

Li başûre Anadolê jî, di nivîsên sedsala XIV an de êlên mina Dulqadir û Remezanî (Yurexîr) derketin holê ku wana berê li wir hatibûn bi cîh kirin û paşe jî mîrîtiyên xwe avakirin û bi vî awayî bûn xwediyê bakûrê Sûriyê.(31"2)

Li başûre Kurdistanê jî gelek êl hebûn ku hinek ji wan paşö hatin dora Mereşe. Şerefxan radigihîne ku li Loristana biçûk êlên Kurd wek: Cengrevî, Ortî, Keriskî, Leşnekî, Rozbahanî, Şaki, Şadîlî, Dawûderanî,

Mehmedkemarî, ji milê Şelbûrî; Qerene, Zirhnekirî, Fadlî, Stodn, Alanî, Kahkahî, Rehvarkî, Deri, Birarinda, Mankredar, Înarkî, Ebûl Ebasî, Alî Maması- şaxen wê- yên Cengrevî û Samî, Esban, Şehî û Erkî hebûn. Wana di sala 1156 an de raste rast girêdayî xelîfe bûn. Husammeddîn Şûhlû yê ji Tirkmenên Avşar girêdayî Selçûqiyan bû û rêvebirê herêmê bû. Ji êla Cengrevî Şûcaaddîn Xursîd, ji ber zilma Şûhlû piştgiriya gelé jî wergirt û dewleta Xûrşîdoxûllari avakir.<101-72) Wê demê êla Baharlı li Şehrîzore bû û di sala 1469 an de ew Lora têk dibin û serokê xwe jî Korpîr Alî ye.(10, 76) Ji êlên li jor yên ku em dizanin Şadî û Avşar paşê tên bakûr. Baharlı jî eger Bayindir bin ew jî hatin.

Yawûz Selim pişti şere Çaldiran, pişta xwe qewî kir bi şûnde, vegerî nava dewleta xwe û hêzên Kurd ji bo xwe tehlûke didîtin yan jî ewên ku li herêmên baş rûdiniştin rakirin. Hinek kuştin, hinek şandin Kurdistanê û hinek jî ji nava dewlete derxistin. Gor xwe dewlet ji Kurdan paqij dikir ku ew siyaseteka din bû. Firat dibêje: Ji şêre Çaldiranê bi şûnde, Yawûz Selim bi peşniyaza Idrisî Bedlîsî, navên Haltî-Lohorto û Kurd Bav kire Baba-Kurdî û rojhilat jî kire Kurdistan û vegerî Anadolê. Ji bajarên mîna Qonya, Qereman, Teke, Enqere, Qeyserî êlên koçber ên mîna: Milan, Berezan, Qerekeçî, Cibran, Hesenan, Sîpkan, Hayderan, Zîlan, Celali şandin Wâranşehr, Varto, Mûş, Xinis, Eleşkirt, Patnos, Agirî, Ercîş û Wanê. Wê demê Zaza-Dumbelî li çiyayên Sason, Motkî û Çapakçûrê jî tevê wan kirin.(127 5> Di sala 1510 an de, mafê erdên gelé li Teke (Antalya) dijî, ji alî Osmaniyan ve hate stendin û wan jî serhildan pêkanîn. Bi ser wê ve gelé li wir çû Iranê û bûn alîgirên Şah. Yek ew encam jê derket ku hinek élan dev ji zend berdanV36'18' Ew êlên ku ji dora Tekê derxistinî bi piranî Qeremanî bûn. Ew cîhên baş Yavûz nexwest bila di destê Kurdan de bi minin û bê qanûnî ew derxistin... Piştre ew ji dewleta Sefawî re bûbûn hêza mezin.

Di serdema Qanûnî de Badilî yên Oxûz ji 40 élan pêk dihatin. Navê yekê ji wan "Kurd Oymaxi/êla Kurd" bû. Beri 200 salan êla Kurd Mihmatlû ya girêdayî Canbegan li Kûşadasi (Izmir) bi cîh bûn û taxa Tirkmen ava kir. Hin ji vê êlê li Dinare em di nava Danişmend de dibînin.(8916)

Me gotibû ku Tirkmen/Oxûz hatin Anadolê bi şûnde dewlet û mîrîtî avakirin. C. Turkay dibêje: Dewleta yekemin ya misilmanên Tirk Qcrexanli û Qadî Bûrhanettîne ji êla Salûr-Salgûra ye. Akkoyûnî ji Bayindir; Qeremanî jî Avşar an; Zulqadîrê jî Bayata yê damezirandiye. Arteşa ku Anadol dagir- kiribû bi piranî ji Tirkmenên Oxûz bû.(160'U) Ew jî teyîd dike ku Qeremanî ji Avşaran e, Dulqadir jî Beyat in, ku ji bo lêkolîna me girînge. Dîsa vê ditinê A. Tanerî jî tîne ziman: Tirkmenan 200-300 sal şûnde dewletên biçûk avakirin.l89‘9) Mebesta wî ji hatina Tirkan (1071) ya Anadolê bi şûnde ye. Ew: Qerekoyûnlû (1380-1469); Akkoyûnlû (1403-1508). Di dema Osmaniyan de: Qeremanoxûl- lari (1256-1493) û Akkoyûnî dixwestin têkevin yekîtiya Imparatoriya Osmani¬yan. Taybetmendiya wan a bingehîn, ew koçber bûn.(89'9) Emê ji vir û pêde ew dewletên Tirkmen/Kurd ji nêzik ve nas bikin.

ŞADÎ

Dewleta Şadî, di sala 951 an de, ji alî Muhammed Şeddadê ji êla Rewadî yê ku beşekî Hazbaniyan in ve hate damezirandin.(52) Hinek dîroknûs jî dibêjin ji alî Muhammed Şedad Kartû ve hatiye avakirin.<12:312> Bê guman herdû jî yek kes e û navê xwe yê bi kurdî jî Şadî ye. Wekî di hinek jêderên Ereb, Tirk, Faris û biyaniyan de bi awayên cüda hatiye nivîsîn, lê emê tenê Şadî binivîsîn. Wê hêza han, navê xwe ji wî Şeddadî yê di jêderan de derbas dibe wergirtiye. Di zimanê tirkî de bi kesên şervan, mêr û çavnetirs re dibêjin Şeddad; ku ji şîddeta-şer tirkî tê. Divê di zimanê erebî de jî wiha be, heta koka wî ji erebî tê. Şukru Kaya Seferoglu dibejê: Şadîlî/Şadiyan/Şadan, bi navgirtina Şad navdar in, ew ji tê wata

başbûx.(9171) Di kurdî de jî wata xwe; kesên dil şa, kêfxweş de ye. Dîsa eşkere ye, ku beri Şadî jî nav/navên vê zendê yan jî êlên girêdayî vê zendê cûda bûne. Kî dizane ku ne Yiwa, Avşar yan jî hinekên din bin? Ew îhtî-mala jî heye...

Dîrokzanê Ermenî Mosedsalaes of Khoren dibêje: Di dema Tikranê Mezin (BÎ 140-155) de, Madî-Medî li herêma çemê Aras in. Kurd gelé ku 1000 sal BÎ li Qefqasyan dijîne. Bi îslamiyetê re derbasî pâş bûn. Ed Dinûrî jî di pirtûka bi navê "Elahbar Et Tîval" de hebûna Kurdan ê heièmê qebûl dike. Dîsa Dîrokzanê Ermen Leo dibêje: Gelé li navenda serhildana Babaiyan û Xûremiyan Elbaza çiyayî wek Kurduk bi nav dibû.<37) Navê dewleta Kurdên Rewadî ya din jî Memlan bû.(37)

Wekî min di beşên Arran, Xorrî û yen din de jî nivîsî welatê Arran ji destpêka dîrokê vir ve warê Kurda ye. Cama vala bûye lê hertim Kurd li wir hebûne. Di destpêka serdema Ereban de jî Kurd li wir hebûn. Gor peymanên di navbera Ereb û Kurdan de: Kurdan dê bac bidana Ereban, lê ol û kevneşopiyen

xwe ya mina Newrozê dê bi azadî pîroz bikirana. Di wê dema fetîhên îslamê yen cara yekemin ên li Arranê, jêderên Ereb qala zenda Balasakanê Kurd dikin. Nivîskarên Ereb ji Ezerbeycan re digotin "Arran". Di sedsala X an de li Berda, Rewan û Gêncê qala Kürden koçber dikin. Îstîşarî dinivîse, ku li ser riya Tîflîsê/ di bajarên li ser rê de 'Deriye Kurd' heye ku ji vê re dibêjin " Bab¬ul Ekrad". Kurê Kartuk Mehmed ê Şeddad di sala 951 an de li Gêncê dewlet avakir û heta 1200 an ew berdewam bû. Ji bo ji Alparslan re alîkarî kirin bajarê Anî dîsa dan vvan. Di sala 1124 an de bi ser erişen Gurcî/Kipçak de leşkerkeşen Şadî çûn Tîkrîta lraqê.(12S'45) Nivîsandina Ereban yê Arranê di ci de ye, lewra ew berê cîhê are pîroz bû. Deriyê Kurd ji girin ge, ji bo min wata vê yekê heye; lewra: beşek ji Kurdên vê re Saka dihatinî gotin di wî deri re, yan ji di vê

gelî re ji bakûr ve dihatin û diçûn. Balasakana, ku nûserên Ereb radigînin ji gelek girînge, ew peyva di wata Saka yên bilind de ye. Ihtîmaleke ku navê Şadivan yê bere ew bû! Ku me berê gotibû Saka kalên van Kurdan in.

Li dora salên 900 an de em şopa Şadiyan li dora bajarê Mûsil dibinin. Gelo ew li wir nişstecîh bûn an jî zivistanan diçûn wir yan jî ji Arranê heta Mûsil di destê wan de bû? Hinek jeder qala serhildana wan dikin. Ne dur e ku ewên ji bo tola Eba Muslimê Xorasanî li vê herêmê mabin û ji ber zext, bac, xereca Ereban û astengiyê li ser ola wanê Zerdeştî ew mecbûrî serhildanê kiribin. Wekî Seferoglû dibêje: Şadı ji Xorasanê hatin. Di belgeyên Osmaniyan de wek "Taîfa Yorukan" derbas dibe.(917l) Ez jî di wê baweriyê de me, ku ew ji Xorasanê û Arranê hatin û yekîtiya wan a bilind navê xwe Şadı bû. Ji ber vê yekgirtinê Hezbaniyan di bin rêbertiya Mehmet bîn Hilal de sala 906 an seri hildan û heta Mûsilê hatin. Waliyê Mûsil Ebûl Hecca li hember derket, lê Şadî biser ketin. Xelîfe Muktedîbîllah hêzaka nû şand, Kurd vekişiyan çiyan û artê§ê çiyayê Qendîl û hemû Kurd dorpêç kirin. Ereban rêberê Kurd dixwestin, Kurdan gelek li berxwe dan, lê rê nedîtin û birçî man. Di dawiyê de, ji neçarî M. Hilal teslim girtin û Ereban ew li Mûsilê kuştin. Kurd jî çûn Arranê. Di vê navberê de Ibrahîmê Deysem, dewleta Hezbanî ya Kurd avakir. Paşe Mehmet Rewadî rêvebirî heyna û navê dewletê kir Rewadî.(19‘62)

Hîna Şadiyan dewleta xwe danemezirandibûn, rastî erîşân Vîkîngan hatin. Me di beşa Vîkîngan de jî qal kiribû. Di wê demê de Skandînavya gelek feqîr bû, çandinî hema hema tunebû û xelk li wir bi talanê û masî girtinê dijiya. Vîkîngan erîşî heiêm û dewletên dewlemend dikirin ku talan bikin. Tê wê watê ku rewşa Kurdan baş bûye. Lewra Vikîngan li ser keviran nivîsiye ku ewê biçin welatê Şerqû (Arranê) zêr bînin (Pirtûka G. Larsedsalaon). Ew jî dewlemdiya Şadiyan dide xuyakirin.

T^tên xemilandinê yên Şadiyan

Ev yeka ji alî nivîskarê Swêdî Sundberg ve jî tê pejirandin: di navbera salên 760-1050 an de Vîkîngan bihîstibûn, ku dewlemendî ji Bizans û Rojhilata Navîn tê. Bi riya çemên Volga û Dînyeper diçûn Derya Reş, Derya Kesk, Konstantînopolîs û Rojhilata Navîn. Li Bakûrê Derya Kesk kontrola Xezeran (Tirk-Moxol) hebû. Nizanim Derya Xezer/Kesk navê xwe ji wan girtiye? Yan jî hinek dixwazin navê wan bidine Derya Kesk? Tâ ser vê pêwîste niqaş çêbe. Lê bi nêrîna min na\ç wî Derya Kesk e; ku Kurdan û pismamên wan ev nava lê daniye. Li vê herêmê gelek gelên din jî hebûn û Vîkîngan xwe baş bi rêxistin kirin û ew girêdayî bacê kirin. Kestiyên Vîkîngan taybet bûn û ji nîşkeva erîşî gelên derva dikirin û tablé jî paş vedikişîn. Li destpêkê ew wek kes û grubên serbixwe bûn. Lê ji salên 800 hetanî 1000 an xwe bi rêxistin kirin û tevda digerîn. Vîkîngan ticareta: dîlan, postan, zîv û hingiv dikirin.,73)

Li ser êrî§ên Vîkîngan jî nivîskarê Ereb Ibn Miskawaûh (? -1030) agahiyên fireh dide: Rûsên (Ew ên li bakûr rûdiniştin) ji derya Kesk êrî§ birin ser bajaiê Berda, lê bi 5.000 eskêrên ji bo ku bi kafiran re şer bikin dişûvîtî re rû bi rû man. Baweriya wan ya bi Xwedê hîn zêde hêz dida wan. Rûsan (-Vîkîng-Ş) hetanî eskere dawî ew têk birin. Rûs li destpêkê li hember gelé nenn bûn. Lê paşê xelk kevir avêtin wan û sebra Rûsan teva bû. Bi ser vê de Rûsan sê roj wext dan gelé ku bajêr terk bikin; lê xelk piştî sê rojan jî xwe ji ti deran nekir û xema wan jî nebû. Bi ser vê de Vîkîng derbasî êrî§ê bûn. Mêren bajêr kirin mizgeftê û derî li ser kilit kirin. Jin û zarok jî heps kirin. Kesên dîl dikaribûn xwe bi pereyan azad bikirana. Heta wê demê artê§a misilmanan ji 30 hezar esker pêk dihatî hat. Lê Rûsan li wan jî xist. Misilmanan alîkarî ji meywê girtin. Rûsan xwe li hember mey we yê li

bajer nikarîn bigrin û meywên li daran hemû xwrarin. Paşê hemû bi nexweşiya zik ketin; taqeta wan ya şer nema û têk çûn. Yên saxlem man jî tişt6n ku ji gelên bajêr bi zorê girtibûn; jin û zarokên dîl girtî kirin keştiyan û êvarê di çemê Kûra re reviyan. Evên dîl bûne kolê êdî.(73) Kurdên li wTir ên xwedî hesp hemû reviyabûn. Ewên ku man jî kal, nexweş û seqet bûn. Nivîskar qala arteşa misilmanan dike, gelo ew Ereb bûn an Kurd bûn, em nizanin. Eğer arteşa xelîfetiyê bûye xêre, tê wê watê ku Kurd bi Ereban re di nava aştiye de bûne. Yan jî, yarmetiya dijminê kevn xwestine. Lê îhtîmal heye ku ew tenê arteşa ji mîrîtiyên Kurdên cîran bê.

Lêkolînerê Kurd birêz Alakom jî dibêje: Vîkîngan li destpêke bi teknîka kevn li élan xistin; bi vê serneketin û têk çûn. Paşe mecbûr man ku taktîkên xwe bigûherînin. Ji T.J. Arne jî radigihîne; ku ewên li wir dijiyan Ku rd bûn û ew erîşa di sala 943 an de pêk hatiye.(74) Wê katê, hîna jî Şadiyan dewlet avanekiribûn. Jêderên Swêdî li ser vê babetê gelek detayan didin; li ser yek ji wan keviran de tê gotin: Serokê tîma Vîkîngan îngvar, nêzîkî 30 keştî amade kir û berê xwe da rojhilat... Li ser kevir tê nivîsîn ku îngvar mirî ye. Lê hinekên din bi gelek zîv, pere û tiştân din vegeriyane.(73) Hîna jî ew perê û alavên ji Şadiyan girtibûn li girava Gotland derdikeve. Heta niha 2000 perên Kurd (Merwaniyan) li Swêdê derketin. Ji vir tê fêhm kirin, ku Şadiyan jî pereyên Merwaniyan bi kar anîne.

Piştî alafê/agirê Vikîngan şere kevn berdewam dike; ew jî îspate; ku ti lihevhatina Ereb û Kurdan hîna jî nine. Ibn Al Asir radigihîne; ku di salên 984 an de xelîfe Hamdan Ibn Hamdûn dîsa diçe ser Mûsil. Li wir tekoşîna Xariciyên Kurd û Ereban heye; wana diperçiqîne. Xelîfe li ser rêva Bexdayê kete bajarê al-Hasedsalaniyê. Li wir kesekî bi navê Şaddad, di

keleheka mezin de bû ku 10 000 eskerên wî hebûn. Xelîfe arteşa wî têk dibe û kelehê jî dixelîne/ xiravê dike.<3'57)

Gor wan agahiyan beşekî ji Şadiyen wê demê li dora Mûsil dijîn. Wekî berê jî min nivîsî, ew ji Xorasan (750) û başûre Rûsya yê hatin; dibe ku ew dem dema Hûnan be jî. Dema ku li vê herêmê tên tespît kirine rastî berî Islamê te. Wekî ku Al-Balazûrî radigihîne, serleşkere Ereb Utba Ibn Farkad, Şehrîzor (642-643), Samgan û Darabad ji destê Kurdan girt, gelek ji wana kuştin, ew girêdayî xerecê kirin û heta Ezerbeycanê kire bin desthilatdariya xelîfe Omer.(105 24) Bê gnman em nizanin ku ew xelka jî Şadî bûn an na? Lê piştî çend sedsalan em dibînin ku Şadî li Şehrîzor/Rewandûz in, yanê bajarê zorê. Rewandûz bi êla Şadiya ve jî jihev nayên qetandin. Rewandûz-Şehrîzor keleha Kurdên serhilderê. Keleha berxwedanê ye, çend caran artê§a Ereban bi hezaran esker erîş kir û §erên bi xwînî pêk hatin. Hesnewî kurê Huseyn ku yek ji mezinên Şehrîzore bû di sala 981 an de ala azadiyê li Demar û Şehrîzore bilind kir. Xelîfe Bexdayê çar caran arteş şand ser Hesnewiyan lê wan her çar caran jî artê§ şikandin.(916ü) Ji wan agahiyan ev derdikeve holê, ku Şadiyên ji Şehrîzor heta Arranê çalak bûne. Mirov dikare herêma Gîlan, Qazwînê jî lê zêde bike. Ew niqta girînge, ku berî Islamê jî û pişt re jî Şadî li wê herêmê hene û wek tê zanîn herêmeka gelek bilind û çiyayî ye.

Şehrîzor, yanî bajarê hêz û zorê; fermanrewayên wê her dem Kurd bûn û çi kesê xwediyê zorê bûn, bê zehmetî pê§iya xwe radidan û li ciyê fermanre- wayê rûdinîştin. Wekî tê zanîn gund û geliyekî bi navê Xelekan li geliyê Xele- kanê, gundekî mezine û nêzîkî Koysancax.(137'480) Gelî û gundê bi navê Xelikan jî îspate, ku Xelikî-Reşî di nava Şadiyan de bûne û ew berê li vê herêmê jiyane. Hîna jî beşekî ji Xelikan li navenda Anadolê ku ew girêdayî Reşiyane û beşek jî li Xorasanê serbixwe ne. Gumana min nîne ku Xelikî jî di bin sîwana Şadiyan de bûn, lewra yek ji êla bi hêz ku

Şadî pêk tanî jî ew e. Paşâ ew êla şervan emê di bin navê Celaliyan de bibinin ku di wir de heman êl in, lê dem bi dem di bin navên cûda de ew xwe bi rêxistin dikin.

Yeşîlgoz jî dibêje Şadî ji başûr, dora quntarên çiyayên Zaxrosan ber bi bakûr ve hilkişîn li Gêncê xwe bi rêxistin kirin. Navê serokê xwe yê yekemîn Mehmûd e. Navê dewletê jî bi navê bavé xwe nav kir û kirin Şadlû an jî Şadîlû.(39) Bi navkirina wek Şadlû ne li gor termolojiya Kurdî ye, di vê de şaşitiyek heye, ew peyva ji alî Osmaniyan ve hate bikar anîn; ya rast Şadî ye. Torî dibêje; Haz- banî di sala 906 an de hatin damezirandin.(38) Şadî beşekî ji wan in. Navê wan jî balkûşe, ku tê wata ewên hêz bilind. Mümküne ku federasyonên élan yekîtiyek çêkiribin, navê wê jî hêza-bilind lê danîbin. Ji ber jîrbûn û şervaniya Şadiyan,

ew nava peşket, lê ew jî belav dibin. Di heman salé de Şadiyan herêma Nînova xirab kirin û ji alî xelîfe ve hatin taqîp kirin. Pêne hezar malbat bûn û hatin Ezerbeycanê û li bajarê Salmas bi cîh bûn. Li Urmiyê herêma Ûnşû jî di destê Hazbaniyan de bû. Di navbera herdu Zê yan de jî zivistanê derbas dikirin.(38)

Di pirtûka "Exbarûl Dewle" de tê gotin; ku Merwanî ji êla Hemîdî va Kurd in; Rewandî jî qebîleka ji êla Hezebanî ya Kurd in ku di navbera Hewlêr û Ezerbeycanê de dijiyan û zozanên wan Aşne-Aran bû.(157'475) Di vê jêderê jî vekirî xuyadike ku ew hêza hanê, di navbera Hewlêr û Arranê de dijiya. Wekî Kürden din ên koçber, ew jî havînan diçûne Arran, zivistanên sar jî diçûne aliyê Hewlêrê. Seven, niqteka balkâş dide xuyakirin; Deylemî ji holê rabûn bi şûnde, li Tebrîzê malbateka Kurd ê mezin bi navê Rawadî xuya dibe. Ji vana ya herî bi nav û deng di navbera salên 1029 û 1054 an de, ji bilî Tebrîzê kesê xwediyê kelehên li çiya yê Vahsûdanê kurê Marnlan bû.(,50',5) Yanî berî Şadiyan, li vê herêmê Deylemiyên ku em wek Kurdên

Zaza dizanin li vê herêrnê bûne. Zaza demeke dirêj li wir serbixwe dijîn; bi batina misilmanan re ew herêm vala bû û Şadî lê bi cîh bûn.

Bi dîtina min, Şadiyan li Arranê dewleta Kurd damezirandin û xwe baş bi rêxistin kirin bi şûnde, êdî dest bi tûkoşînali hember Ereban kirin. Di sala 971¬990 an de Gêne û beşekî Ezerbeycanê jî heynan û ew der bi Divînê ve 100 salan di destê Şadiyan de bû. Di navbera salên 983-1066 an de başûre Ezerbeycan jî dikeve destê Şadiyan. Pişti vê wergirtinê, yanê di navbera 1051-1060 an de Tirk erîşî Ezerbeycanê dikin û di 1064 an de Qers dikeve destên wan.|,ïï| Wersiyoneke din jî heye ku dibêje: di sala 1064 an de Selçûqî (Alparslan) hatin ber Anî yê, parastina wê baş bû lê bi îxaneta fermandarê Grekî, ew ket.(18411) Berî ku Tirk werin herêmê, xuyaye ku îttîfaqa Grek û Kurdan jî heye. Ew îttîfaqa li ser berjewendî, ol û coğrafya yê bû. Herdû alî jî li hember misilmantiyê bûn; ya din axa herdû aliyan cîranê hev bû û ji bo berjewendiyê herdûyan bû. Bîzansî di vê baweriyê de bûn; ku eger Kurd bikevin, dora dê bê wan, Ji ber tirsê û ji bo ku xwe bi Tirkan şârîn bid in nişandan, jî îxanata di xwîna wan de ew mecbûrî hevkariya bi Tirkan re dike. Bi vî awayî jî Şadî têk diçin. Gor dîtina Mînorskî, Şadiyan bi Selçûqî û Bizansan re îttîfaq kirin.(51) Li ser wê îttîfaqê zêde agahî nînin; lê Kurdan li hember Ereban bi Bîzansiyan re, li hember Bîzansiyan jî bi birayên xwe di nava Selçûqiyan re îttîfaqê kirine. Bi taybetî ji di §erê Çaldiranê de ew pêk hat, ku Kurdên di nava Bîzansiyan de derbasî alî Selçûqiyan bûn.

Şadî xwedî du payîtextan bûn: Yek Gêne ya din jî bajarê entîk Divîn bû, Şaxû din ê Şadiyan jî li Anî (1072-1199) ye hukum ajot. Selahaddin Eyûbî jî kurê Yûsûf bin Eyûb bin Şadî bû.(65) Xwedî dû payîtextan bûyin jî balkêse: çima du payîtext? Ew dide xuyakirin ku Şadî ne homojen in, ew ji çend kon/ federasyonên élan pêk têne û rêvebiriya wan li ser esasê lihevhatinê, yanê nê bi zorê ye. Kon/federasyonên ku dewletê pêk tînin

jî herî kêm dido ne. Lê îhtîmal heye ku ew zêdenê jî. Ewê ku em dizanin yek Kon/federasyona Şadiyan e; yan din jî Badilî ne. Yen ku nayên zanîn jî Reşî ne. Ew hersé kon/federasyonên

élan di bin sîwana-navê Şadiyan de dewletê avakirine. Bi hatina Tirkan re, em dibinin ku têkçûn, belavbûn û hevkariyeka bi Tirkan re heye. Mirov dikare bêje ku her sê kon/federasyonên élan jihev cê dibin. Şadiyen ji zenda Rewadiyên Arranê tên (951-1088) bi Şadiyen Divînê (1020-1088) ve ji Selçûqiyan re rebertî kirin. Serdarê Selçûqiyan Alparslan ji Arpaçayê heta Agiriyê mîrîtiya Anadolê da Şadiyen Anî (1064-1209) û ew girêdayî Selçûqiyan bûn. Ji kurê Şadı Eyûb fermandarê bi nav û deng Selehaddîn Eyûbî bû.<49) Di belgeyên fermandariya arteşa Tirk de jî hatiye nivîsin; ku Şadı (951-1174) ji birra Iskit-Saka yê ku tirkî diaxifine. Mile Gêncê Sedatoxûllariyan di navbera salên 951-1088, milê Divin 1020-1162, milê Anî yê jî di navbera salên 1064-1200 an de hukumdariyê ajotine. Dema Alparslan hate herêmê, Şadiyen Aniyê, ji wî re pê§engî kirin û wî jî bajar ji wan rê hişt.(44)Tespîta ku ew ji Saka ne girînge û raste. Bi vî awayî jî mirov dibîne ku çawa komên Kurd nav guhartine. Eger mirov ji Hatiyan destpê bike, bi dor dibin Saka, Şadî, Celali û ji wan jî êlên cüda derdikevin.

Anî ji alî Gurciyan ve hatibe dagirkirin jî, di salên 1165-1174 an de dîsa hate wergirtin. Şadî gelek rewşenbîr bûn û abîdeyên balkê§ ji xwe şûnde hiştin.(51) Şadî ji alî Melîk Şahu? Selçûqî ve ji holê hatin rakirin. Gelek avahiyên dîrokî yên bi zerafet çêkirin.(12'312) Parçebûna Şadiyan gelek balkê§e. Balkê§iya wê jî piştî serkeftina Alpaslan pêk tê... Gelo ew bû sedema dewletên cüda yan jî yên dijminê hev? Ew beşbûn li ser pirsgirêka olî bû an jî li ser hevkariya bi Tirkan re bû? Yan jî çi bû? Divê ji van pirsan re bersivên bê alî bên ditin.

Gorî Torî radigihîne jî; gava Tirk cara yekemin hatin herêma Arran li wir bi mîrîtiyên Kurdên wek Şadî û Hazbanî hebûn. Ew herdu mîrîtî girêdayî

êla Rewadî (divê Zend be-şoreş) bûn. Wê demê li çiyayên bakûre Ezerbeycanê Celali; li başûr, ji Erdebil heta Muganê jî êla Çakûrlû dijiya. Li wan warana ji berê ve ew êlêna hebûn.(38) Cemal Reşîd Ahmed dibêje; welatê wan Qerebax e. Qerebax, berî destpêka îslarnê navenda desthilatdariya Kurdan e. Heta der- ketina Islamiyetê li wê herêmê zaravayên Medan kurdî, tatî, herzeni û talîşî dihate deng kirin. Li Tebrîzê dewleta Kurdên Rewadî heta roja Tirk derketin holê berdewam kir. Di sala 1066 an de Tirkên Oxûz gihîştin Şerwa^. Gorî Mûneccimbaşi, Oxûzan malên Kurdan talan kirin, gelek zêr, sîleh birin û serok Ebûl Esvar di sala 1067 an de mir. Şadiyan di sala 969 an de li Arranê (Bajarên wek Tiflîs, Gênce/Kence, Şemkûr, B1LKAN, Alan diketin nava Arranê) kraltî ava kirin.(;>r) Şadiyan bi Ertûxrûl re şer kirin û ew têk birin. Di sala 1081 an de birayê Melîk Şah Şadî têk birin û di sala 1072-92 an de dawî li Şadiyan hat.

Dema Alparslan êrî§ê Aniyê kir, li vê herêmê di navbera Kurd û Gurciyan de tekoşîneke mezin hebû. Alparslan Anî heyna û teslîmî Ebûl-Eswar kir. Lê li derdora salên 1118 -1124 an de bajar dîsa ket destê Gurciyan.(43) Anî di salên 1126-1161-1174 an de ji alî Gurciyan ve hate wergirtin, lê dîsa kete destê Şadiyan.*2 72) Di sala 1126 an de Siltan Sancarê ku li Xorasanê hukumdarî dikir, mîrekî clin ê Şadiyan yê bi navê Fazlûn şand û Anî rizgar kir. Di nava xaçperestan de navê Elî yê kurê Saltûk mezin bû. Odorîc Vîtal: "Cîranê Begê

Xarpûtê {Belek) û kralê Medan Elî" dibêje. Ev yeka tê vê watê, ku Saltûkiyên li Erzirûmê Kurd bûn. Emîr Elî di salên 1102-1124 an de emîrîtiya Erzirûm birêve bir. Fahreddin Şeddad di sala 1155 an de bajarê Anî ji birayê xwe Fazlûn re cîhişt îı çû Şame. Bavé waliyê Şame Şîrkûh Şadî bi xanedana Şadı ve girêdayî bû. Gûrciyan di sala 1162 an de Qers heynan û merkujiyeke mezin kirin û 30 hezar kes dîl girtin. Di sala 1164 an de Anî

dîsa teslîmî Şahînşahe Şadî hat kirin. Di sala 1174 an de dîsa derbasî Gûrciyan bû û di kîtêbeka ji sala 1198 an mayî de tê nivîsîn ku hîna jî Şadî li wir bûne. Bi hatina Moxolan ya di sala 1239 an de, nişтecîhe ku lê dijiyan çûn Wan, İran, Trabzon, Kirim û Astrahanê.(43> Moxolan hêza Kurdan gelek kêm kiribû.

Bi belavbûna Şadiyan re komên jê veqetiyan, bi taybetî li Anadolê gelek mîrîtiyên serbixwe avakirin. Taybetmendiya Şadiyen mezin jî, ew di nava xwe de hemû zaravaxêfên kurdî gîhandine hevdû. Ev bihevre bûn, ê paşe li coğrafya Anadolê jî xwe bide xuyakirin. Yanê tabloya li Arran hema hema li navenda Anadolê jî derkeve hole. Beşek ji van Kürden Ler/Şexbizin bûn. Ji wan re Kürden Xoyî û Urûmiyê jî tê gotin.(32) Wekî tê zanîn ji bo Candariyan (1212¬1478) jî dibêjin Xoyî, ku di sala 1357 an de Sînop û Qastamonû di destê wan Kurdan de bû. Malbata Şadiyen ku serokên wan jê derketî, navê xwe Pûrzayî- Bazayî-Bizayî-Yazayî bûye. Tê zanîn ku ew Kurdên ji Dêrsîmê yen nav Şadî jî ji vê binemalê ne, yanê kalikê serokê Eyûbiyan in. Gava ew hatine wêderê bûne du par: Çemîşgezek û Şebîn Qerehîsar-Amasya. Di vê demê de li hemberî wana tenê Ermen, Gurc û Rom hebûne. Li destpêke bi hevre hevkarî û îtîffaq kirin. Di sala 1210 an de rêberê bi navê Kurdî dibe serok û tê dîtin ku Selçûqî xwe ji wan diparêzin. Di serdema Selçûqiyan de bi xaçperestan re îttîfaq kir û li dijî misilmanan şer kirin. Ewana, êla bi navê Şadî li Amasya, li Osmancikê û li Çorûmê jî Xalidiyan bicî bûn.(32) Ihtîmaleke ku ew Xalidiyana kalên Xelikên îro li cîhên cûda dijîne. Di salên 1250 an de, ew herêma êdî carekê diket bin destê Qeremaniyan, carekê diket destê Selçûqiyan, Inalyanû Eretnayan. Di sala 1255 an de serok Xayî-Qeco, Kurdên bi navê Candiran ji alî Şebîn Qerehîsarê anîn li hêla Osmanciq û Tokatê bi cîh kirin. Paçê Kurdên bi navê Çarmoryan li alî Çorûmê bi cîh kirin. Di sala 1272 an de Kurd Şah bû serok. Çend kurên wî hebûn û hemû

ji êlên xwe ra bûn serok. Toraq, Şehabeddîn Şadî, Bilo-Bilban, Salar, Seyfeddîn Canbêzar. Bi hozên li Xorasanê ve navên wan yek in. Di sîstema dewletê de serokê hemû parêziya Umeddîn Orner el Lorî ye û ba^ş e! Bi erîşa Hacî Şemseddîn Şadî (Enqere, Çanqiri, Çorûm, Toqat, Sînop, Canîk, Amasya, Ş.Qerehîsar, Qeyserî di destê wî de bûn) ew gela ji Amasya di sala 1337 an de derdikeve diçe Xerno§ê.(32)

Li ser Kurd bûyina Şadiyan ti guman nînin û ev yek ji alî hemû dîrokzanan ve tê pejirandin. Heta hatina Tirkan ew serbixwe dijîn û xwedî dewleteke bi rêk û pêk bûn. Gerokekî Ereb dibêje: gelé wir nêzîkî milyonekî hebû.(184‘n) Gor wê demê ew serhejmar gelek e. Lê dema mirov li komên ji wan veqetiyan û dewletên din avakirine binêre bi vê hejmarê bawerî tîne. Ji

Şadiyan beşek ber bi çiyayên xwe çûn, hinek çûn rojhilatê Ewrûpa û hinek jî çûn çiyayên Torosan. Li Kîlîkya kraltiya xwe avakirin. Bi hatina Tataran re, 1200, koçberiyeke nû pêk hat. Lê Kîlîkya jî ji alî Memlûkiyan ve di sala 1374 an de hate rûxandin.084111 Bi hatina Moxolan re hêza Şadiyan gelek kêm bû; berî wan jî teko§înên bi Ereb, Gurc, Bîzans û Tirkan yên bi sedsalan ajot de wan gelek zirar dîtin. Bi hatina Moxolên xwînxwar jî ew bi temamî ji hev ketin û belav bûn.

Dema êlên ji Şadiyan veqetiyan hatin rojavayê Anadolê, bi dewleta Rom re rû bi rû hatin. Rome jî xwest Kurdan li hember misilmanan wek tam¬pon bi kar bîne; di esas de taqtîkeka baş bû, lewra Kurdên hatin bi piranî ji kevneşopiya Zerdeştî bûn û li gor misilmanan hîn zêde nêzîkî Romê bûn. Di peşketina Kurdan li rojavayê Anadolê de rola vê ramanê jî hebû. Di vê demê de, Germiyanan li Meletî hêdî hêdî serokatiya xwe bi pûşxistin; li Amasya û Qey- seriyê jî Şadiyan serokatiya êlên xwe dikir. Şadî, xwarziyên Danişmendiyan in û bi wan re jî pir li hev nedikirin. Di nava vê êlê de hozên bi nav û deng mîna; Lorî, Qotorî, Boraqî, Dawûdî,

Dewendî û Rawendî hene.<37) Berê jî min gotibû ku di nava Şadiyan de Lerê (Şâxbizin) ji Lora jî hene. Lewra dîroka Lera di gelek pêvajoyan de bi Şadî û yên girêdayî wan re derbas dibe. Hîna jî dûmahiyê wan li Erzirûm, Gîlan, Enqere-Haymana, Qonya û li cîhên din hene. Wekî nivîskar dibêje: Şadî jî digihîjin Rewandî Lez-Lekzan; ne di cîh de ye; ber eqsê vê: Lerê di bin sîwana Şadiyan de bûn. Şadiyûn li Tiflîz, Bako, Nahcivan, Şîrxan-Xarpût, Xelat, Erciş, Şimşatû belav bûne. Li ser Rewandiyan Major Rawlensen dibêje li Ezerbeycan 12 hezar nifûsa Rewandiyan heye. Pî-resorî, Balekî, Riso û Şervvanî ji vê komê ne.(37) Riso, gereg Reşî bin û bi qasî ez tê digêjim Şerwanî jî kalên Sewêdiya ne. Selîm Biçûk dibêje Rewandî 12 ber in: Mamgûrd, Mamsa, Mamsil, Mamxal, Mamlis, Marneyî, Mamkal, Mamiskî, Mamsan, Bêrbal û Gelo ne.

Gor ragihandina Can Kurd, "Dîroka Ibîn Şedad" de ku bixwe dadkarê leşkeriya Selheddîn e û jînenîgariya siltan bixwe nivîsandiye, dibêje: Dayika Selheddîn ji malbata Harimî bû. Wê dû kurên din berî Selheddîn anîn dinyayê; yek Şahînşah, yek jî Tûranşah bû. Bavé Selheddîn ji êla Rewadiyan (Rewandî) ê Kurd e. Ew êla jî şaxeke ji êla Kurdan ya mezin Hêzan (371-481) bû. Li navenda Anadolê, bi Cûtikiyên girêdayî Reşiyan re "Cûtikên Herêmî" jî tê gotin. Ne dûre, ku herdû peyv ji kokekî derketibin. Ji alî dîrokî ve rastiya vê yekê heye. Rewadî li rojavayê Ezerbeycanê li herêma Dûwîn bi cî û war bûbûn. Rewadiyan berî hatina îslamê nav Kurdan, parêzkarên koçika agirdana Zerdeştî bûn û berî van bûyeran bûbûn stûna dewleta Kurdan Şadî li Tiflîsê (371-481). Navê mîrê wan Fedlonê Sêyemîn bû. Tirkan di ûrîşa xwe de ew herêma jî tar û mar kirin; Şadî, bavpîiê Selheddîn Evûbî yê ku berê xwe dayî Bexdayê ne, ji ber ku wî carekê alîkariyeka mezin ji wezîrê xelîfe re kiribû. Hinek şêxên dînên sofîtiyê alîkariya Selheddîn dikirin. Mîna: Hafizê Rehawî (ji Rihayê), Mûsa

kurê Şêx Ebdulqadirê Gîlan-î û hwd.(77> Ji Tikrîta îraqê jî qedeiê wan bi riya

Mûsil û ji wir jî bo rêvebiriyê ber bi Şam û Misirê dirêj dibe. Vê yekê jî em ji Şerefxan diyar bikin: Hîmê Siltanên Misir û Şame jî ji Şadı yê kurê Merwan in. Ew ji esil ji Kurdên Rewend in. Ji binemaleka mezin û serokeşîr bûye. Li gundê Ecdenkanê nêzîkî Dwîn jiyaye. Bi regez digîhijin Fermanrewayên Şadı yen Kurd. Hevçerxê Emîr Fezlûnê III bûye. Dema ku Emîr Qirtî yê Tirkmen welatê wî ji bo Selçûqiyan îşgal kir, Şadı li welatê xwe bûn muhacir. Di dema desthilatdariya Mesûdê Selçûqî de yek ji sipartedar û karbidestên Siltan Şaciiye kurê Merwan ji bo parastina keleha Tikrîtê hat tayînkirin. Ew mir bi şûnde kurê wî yê mezin Necmeddîn Eyûb li ser kar û baiên bave xwe rûnişt. Birayekî wî jî hebû ku navê xwe Esededdîn Şergoh bû. Rojekê li Tikrîtê dostekî Mesûd ê zilimkar dikûjin û Mesûd ji wan dixwaze ku ew welatê wî terk bikin. Bi ser vê de herdû bira çûn Mûsilê cem Îmadeddîn Zengî.(157'105) Ekrem Cemîl dibêje di sala 993 an de li Şamâ padîşahiya Axşadiyan sererast dibe û li Misir û Sûriyê 40 salan hükümdarı kiriye.19'1591 Divê Axşadî jî şaxekî Şadiyan yan jî ew bi xwe bin, lê ew nava ji ku heynana nayê zanîn; nivîskar vê şirove nake.

Dema Merwanî li Amedê desthilatdarbûn (990-1096) di wê demê de Şadî jî li Anî (951-1088) dewlet bûn. Selçûqiyan di 1049 an de Şadî ji Gêncê avêtin û Anî dan wan û Kurd neçar man ku bi Moxolan re şer bikin.(12 27U) Şadî li sedsala X an li Erîvan-Diwîn ê koçberbûn.<12'279) Mîrê Merwaniyan Nasrûddewle ku li Amadê salên 1011-1061 serokatî dikir, bi keçeka mîrê Arranê ye li dora Behra Kesk re zewicî. Herdûyan jî têkiliyên xwe cûda bi hevre hebûn.(74 39) Ew zewaca jî nîşana wê ye; ku Şadî di asta dewletan de û bi rûmet dihatin dîtin. Di nava arîstokratan de jî ew

kevneşopiyeke. Berê jî me diyar kiribû ku Şadiyan perê Merwaniyan bikar dianîn, ew pere di kolanên li Swêdê de derketin.

Hukumdaiê Amedê Ebû Elî Merwanî, qasid şandin Flelebê û keça emîr Şadûldewle Şerîf bîn Seyfûdewle B. Hamdan xwest. 200 hezar dîrhem qelen şand. Xwest ku ew bûkê bînin Amedê. Lê bi xwe mir. Berbûka bi bûkê re jî tê ji wê re dibêje: "Xemgîn mebe, tu dibî xwedî warê bav û kalên xwe, tu dibî kralîça Amedê.(137'183) Ew jî gotineka pir watedare û mirov dikare ji vê yekê derxe ku ewên wê demê dizanibûne ku ew ji bakûr çûne Sûriyê.

Şadî ne tenê li Şam û Misirê hema hema li hemû Anadolê jî belav bûn. Bi taybetî jî piştî dewleta Eyûbî hilweşiya, ew careka din koçber û belav bûn. Serokekî ji vê xanewanê em li Amasya dibînin. Di sala 1362 an di ew bajara di destê Hecî Şadgeldî de bû, ku li gor jêderan ew Kurd e. Kesên ji vê malbatê tên re Kurtoxûllari tê gotin û di herêmê de, bi navê "Hukumeta Kurdan" çûne rêxistinê. Di sedsala XVIII an de Bozok, Amasya û Çorûm wek Ekradî Lek Kazasi derbas dibe.(12fi'64) Lek/Şexbizin li vê herêmê gelek dehsalan jiyan em dizanin, lê têkiliya Şadgeldî bi heran re heye an na, em nizanin. Mumkune ku ew Lerên di nava dewleta Şadî de ne. Li eyelata Amasya, wê demê malbatên dewlemend, xanedan û esîl gelek in. Navê wan; Gumuşluzade, Sûnkûrzade, Torûmtayzade, Halifetzade ne. Hecî Şadgeldî ji Kûtlûzade ye û Kurd e. Mîrîtiya Hecî yê bajarên mîna: Amasya, Tokat û eyelata Canîkê dike nava xwe. Wana

bi navê Kurdoglû (malbata kurê Kurdan) jî binav dikin û navê hukumetê jî Hukumeta Kurda ye; yan jî "Al-î Kûtlûşah Emeratî" ye. Ew emerat dixwaze li rojhilat, Mûtahhartene navendaxweli Ezingan û bajarê mîna: Ezingan, Baybûrt û Tercanê jî di dest de dagir bike. Bi rû wan de begê Kemah û Yelman Begê Çemişkegeke yen Kurd ku girêdayî Mûtahharten bûn û li rojava jî dewleta Eretna heyna nava xwe.

Muza Şadiyan - Bojnûrd / Neynikxane

Di dema Yawûz de jî em dibinin Şadî li Amasya û Sêwasê xwedî gotin in. Ew yeka di nameyeka ji Osmaniyan mayi de wiha tê eşkerekirin: Dema Amed ji alî Sersor-Sefavviyan de hate dorpêç kirin, hêzên Osmanî amadeka- riya alîkariya Amedê diki rin. Lê Yawûz nedihat Amedê û Biyikli jî bê destûra wî nediwêrî ku eriş bike. Di wê demê de defterdarê Osmaniyan Hoca Nîza- meddîn ji Yawûz re xebereke bi vî awayî dişine: Biyikli Mehmed ku begê Bay- bûrte û Begêbegan ê Sêwas û Amasya Şadî Paşa re rêhevaltiyê bike û ewê herin alîkariya Amedê. Gor bersiva hatî, Biyikli wek serdar û Şadî Paşa jî bi pêne hezar siwariyan ve derketin rê, Qerehanê Sersor ew yeka bîhîst û vekişî Mêrdînê. Biyikli xwest ku wî bişopîne, lê Şadî got paşa tenê ji bo Amedê ew wezîfedar kiriye û leşkeren xwe heynan û çû eyalata xwe.(13M%)

Di sala 1908 an de li Mazgîrta Dêrsîmê Şadiyan 500 esker derdixistin û 40-50 sîlehên wan ên nûjen jî hebûn. Nîv girêdayî dewletê bûn û şexsiyeten xwe mîna îzolan bûn; axê xwe Zulfo bû,(116'106)

Şadî yek ji êlên Kurdan ya pir bi nav û deng û bûyî xwedî dewlet e. Di alî rêxistinî, çandî, civakî, çandinî, avasazî û hünere de gelek peşketîbûne. Berhêmen ji wan mane îro negîhiştin desten me, ji bo vê agahiyên me yên li ser wan ji desten diduyan in û ji alî dagirkeran vehatine nivîsîn. Li Xorasanêhinek tişten ji neviyê wan re mane bi orjîna xwe li muzeya Bocnûrdê (Neynikxanê- Muza Şadiyan) hene û min dîtin. Gor dema xwe peşketî ne. Devvleteka bi vê îhtîşamâ, mezin û bi qudret ji kijan êl û konfederasyonan pêk dihat, hêzên ku ew pek dianın kijan bûn? Ji bo vê emê serî li miser, dîroknûs û dîrokzanan bidin. Di nava wan de gelek

nakokî û ne zelalî heye em dizanin, lê ji bo ku jêder yên destên didû û sisi yan in ew jî xwezayî ye.

Yeşîlgoz êlên girêdayî Şadiyan wiha dinivîse:

Sêvgarî (Sêvkarî-Sêvika) yê li Tohlistanê; li 61 gundên Sêwas û Refahiyê; li navça Dêrsîm Mûhûndlûyê bi cîh bûne. 14 Qers-Gole; Agirî, Erzirûm jî hene û êla herêmê ya herî mezin e. Li Qonya û Xorasanê jî hene. Nivîskarê vê pirtûkê jî ji vê êlê ye.

Çakan: Li navbera Dêrsîm û Bîngolê de û li Ezingan herêma Mitînî bicîh bûne û Kurmanc in.

Kubatı: Di navbera Dêrsîm, Kîxî, Karliova, Bîngolê de ne.

Balaban/Bolobaniz: Amed, Riha, Enqere, Pulumur (Yawûz gelek zirar da wan).

Alhas (Atmali) Germiyanî

Lertik: Kîxî û Karliova (gereg ew Lerî bin-Ş).

Cûnan: Kîxî, Karliova.

Oxçiyan: Qerekoçan.

Setêr: Herêma Holhol.

.A _

Izol: Riha, Meletî, Dêrsîm, Sêwas, Mazgirt.

Hiran: Dêrsîm, Mazgirt.

Savalan: Dêrsîm, Pulumur (Ji êla Dêrsîmê).

Sûrizo: Dêrsîm, Mazgîrt.

Rûtan: Dêrîk, Hozat, Iran, Ezingan.

Caferî: Ezingan.

Demeno: Çiyayên Mûnzûr.

Usedsalaûvo: Palû, Dêrsîm.

Seyidan:

Kimsor: Nazimiye, Sêwas û Mazgirtê hene.(39)

Evv élan hema hema bi temamî tên nasîn û gelek ji wana min di cîh de dîtine. Sêvikan li Qonya çar gund li Xorasanê 60 gund in. Li Semsûrê jî gelek in. Atma jî gelek in û bi giranî li dora Germiyan-Elbîstanê ne. Lera jî li her cîhî ne. Oxçî jî li her derê hene; li Anadolê cama di nava Reşiyan de, carna jî nêzîkî wan tên hesibandin û li Kurdistanê (Qerekoçan) jî gelek in. Di nava sînorên Sûriyê de jî hene. îzol bi giranî li Maden-Amedê rûdinên. Rûta çar gundên xwe li Haymanayê, li Kadinhanê, li Xorasanê û li gelek cîhên din jî hene. Seyidan di nav Milan, Serê Qaniyê û li Xorasanê hene. Na w êla Germiyan ba^şe, dibe ku ji mîrîtiya Germiyan hatibe û îhtîmaleka mezine ku êlên ew dewleta pêk anî jî yek in. Êlên din ên min ziyaret nekirî jî bi piranî li Dêrsîmê ne. Li ser Kimsoran hevalê birêz Haydar Işik dibêje: Ji 33 gundên Nazîmiyê tenê gundê bi navî Kismor (Kimsor) Kurmancî diaxife. Niha kes lê nemaye; li Mazgertê gelek in. Ji Kismoran xelk berbi Baybûrtê jî koç kirin. Taybetmendiya wan êlana ewe, ku xwedî çandeke gelek nêzîkî hev in. Ji alî fîzîkî, ziman, çandî, rûhî û civakî ve wek hev in. Ew jî îspate ku ew bi hev re jiyane û ew dewleta bi hev re ava kirine.

Asiyanli (Azan), Alîzerlî, Şedadîfer (Şedadâ bi hêz), Şedadî Ker (dêw), Şehiyanli, Berhûşlar, Dûmkanlar, Vasillar, Şêx Haydarlar, Şêx Alî.(1(M 27)Cunan: 700 kes in, şafîî ne û li Kîxiyê dijîn û ji koma Şadî ya ye.(108'68) Gor heman raporê, Şadî li Qerekoçan û gundên wê mîna: Okçûlar, Akarbaşi, Çayirgulu, Çamardi, Akçîçek û Kizilca dijin, 2873 kes in.<108-104) Dîsa li Refahiye û Tercanê 5301 Şadî hene ku ew bi Kurmancî û Dimilî

diaxifin û Elewî-Sersor in. Beşdarî serhildana Qoçgirî û ya Kurd 1338 (hîcrî, îro 1428 in) an bûne.<108 n6) Li Xinisê jî 1000 kes; li Çat û Karliova 3185 kes xuya dikin û Elewî ne.(lü8136) Li Af§în-Mere§ê 1518 Şadî dijîn, ew Caferî-Elewî ne.(108'213) Li Kangal 3341 kes dijîn û Caferî-Elewî ne.(108' 283) Li Sûrûçê 10. 000 kes dijîn, Henefî û Kurmanc in; bi xismên xwe li Sûriye ve tekildar in.(108'337)

Şadî, li Refahiyê-Sêwasê li nahiya Gümüşler, Kabûller, Ardiçlik, Çatalçam û gundên mîna Armûtlû, Kizilînîş, Soxutlu û li navça Tercanê jî li gundên Sarikaya, Armûtlûk û Gokdere hene. Nifûsa xwe 5301 kes in. Ew Kurmanc û Zaza ne, Elewî-Qizilbaş in.(164149) Li Kangalê jî 3341 kes (Kurmanc-Caferî-Elewî); li Mazgîrtê 6908 kes (Zaza-Caferî-Elewî) hene û li Qerekoçan jî 2873 kes (Kurmanc-Henefî) hene. Dîsa li Xinis, Tekmenê 1000 kes (Kurmanc- Henefî) hene. Şadî û Laloxûlari liÇatêheneû hejmara wan 3185 kesin, Kurmanc

in. Bilikan (Hasesoran) milekî Şadiyan e û 11 Eleşkîrte dijîn. Hejmara xvve 3250 kes in, ew Şafîî û Kurmanc in.(,64‘151) Li Anadolê Bilikî giredayî Reşiyan xuya dikin.

Du günden Bilikan Hesina û Heciyan

Li Xorasanê jî êla Şadî gelek mezine, nivîskarê herêmî Mesûd Key han li ser wan vê agahiyê dide: Boxî (Şerî, Hecîkî, Hüseynî, Mişî), Alanı, Bedrî, Qaçkî, Qerebaş, Kopirî, Keçerî, Meterî, Hemzikî, Çekmaxî, Sirî, Diri, Izanî, Qiliçî, Dirîqanî, Inranî, Qordanî (Gordanî), Cûyanî, Qirîvanî, Capanî, Kaqanî, Xinzor, Qereçorî-Qereçorî (= 36 ber?) a-Silûr, b- Şaqulî, c- Develî, ç- Qere Welî, d- Kersan (Sersan). Li günden Aşxane ye mîna: Gazı, Şerebedî Kurd, Şaaba, Kelê Necef, Çîllîk, Qelê Mûsalî, Qelê Melle Hesen dijîn. Di sala 1311 an de / 1932= 18 300 xane ne. Henri Fîld jî dibêje, di

sala 1938 an de 80.000 kes in. Emê di beşa Kurdên Xorasanê de bi berfirehî binivîsîn.

Kurdên ku girêdayî kevneşopiya dewleta Şadî ne bi şervanî û mêraniya xwe jî navdar in. Ew şervanen wan di qada şer de wekî şer û pilingan û kesekî nedikarî zendê wan deyne erdê. Ji bo vê jî bi gelek dewlet û împaratoriyan re heta belavbûnê bi sedan salan şer kirine. Şadiyen li Xorasanê dibêjin dema diçûn şer, serçavên xwe bi xwînê yan jî bi arangê boyax dikirine; ku dema birîndar bibin bila xwîna wan xuya neke û hêviya hevalên wan ne§kê. Vê yekê em li cem Mehmûdiyan jî dibinin. Tanerî dibêje: Wexta eskerên Mehmûdî diçûn şer rûyên xwe bi sor, zer, kesk û spî reng dikirin. Hemû oldar, durist, bi îman û Şafîî bûn.(S9'136) Ew Şadiyen qehreman îro têla têla belav bûne, hinek heliyane û hinek ji hev êdî fêhm nakin. Her çiqas bi sedan salan ji Kurdîtiyê dûr ketibin jî, di gew'herê nava wan de, wekî di dîroka wan a bi şan û şeref de jî xuyadike hestên Kurdatiyê di dilê wan de pir xûrt in.

DANIŞMENDIYAN

(1062/1080-1177/1178)

Ew navê hanê îhtîmaleka pir mezine ku Tirkan lê danîbe, lewra daniş-me/mak ji tirkî tê û di wata §êwirmendî ye. Bê guman navê wan ê esas ne ewe. Piştî Kurd û Tirk hatin Anadolê, di dû gelek şer û têkiliyan de ew nava li van Kürdana danine û bi vî awayê jî derbasî dîrokê kirine, Berê jî me gotibû ku Harûn El Reşîd di sala 845-956 an de ji bo parastina rojavayê welatê misilmanan, federasyon/ konfederasyon êlên bi nav û deng ên mîna Badilî -ku ji 52 tîran pêk dihat-Şadî- ku ji 125 tîran pêk dihat - anîn û li rojavayê Kurdistanê bicîh kir. Cîhê ku lê bi şûn dike jî Meletî, Ezingan û Baybûrt e. Tê îddea kirin; ku di wan deran de berê jî Kurdên Êzdî, Ermen,

Rom û Erebên Xaçperest hebûne. Di dema şerû li hemberê xaçêperestan de bi hevre îttîfaqê dikin û xaçperest ji van deran diçin. Hinek ditin jî hene dibêjin ku di serdema Rewadiyan (802-920) de, ew êlana ji dora Gîlan û Xoyê hatine li wir bi cîh bûne. Dibe ku wê demê bi pişgiriya Rewadiyan hatin bakûrê Kurdistanê. Seyid Bettalê wek rêber tê nasîn jî bi wan élan re hatiye û li dora Meletî bi cîh bûye. Heta sala 950 an dema wan di tarîtiyê de derbas bûye û di nav Badiliyan debuhuriye. Seyid Ebasê Meletî di salên 900-930 an de bi olperestî û zanîna xwe deng daye. Di salên 1052 an de bi Ehmedê ji qebîla Tiganî-Ticanî-Tîxanî ve li hev nekirine û ew reviyane gundê Xijdewanê yê li Mazenderan. Abdulxaliq li vî gundî tê dinyayê û vî serokî bixwe lêkolîn dikir û xelk pê dişêwirî û ji bo wê navê wan "Danişmend" hatiye gotin.f43)

Gor Prof. Osman Tûran ji "Tarîx duwel el Islam" û "Mirqat Alê Danişmandiye El Kamîl fît Tarîxe" radigihîne: Abdûlxaliq di sala 1062 an de, navbera Sêwas û Meletiyê kiriyê bin destê xwe. Bi cîh bûna li herêmê, peşî li Roma girt, bi Ermen û Gurciyan re jî gelek şer kirin (1070) û zora wan bir.(43) Li gora bi wan hemû hêzan re şer kiriye û zora wan biriye, ew gelek bi hêz bûne. Kara jî wiha tîne ziman: Piştî §erê Melazgirê, yek ji fermandarê ku Anadolu heynayî Ahmet Gazî yê Danişmendoglû li Amasya, Nîksarê mîrîtiya xwe avakir û navenda xwe Sêwas bû.(U8'237) Di pirtûka "387 Nolu Muhasebeî Vîlayetî Qereman ve Rûm Defteri- II" de tê gotin: Di sala 1071 an de Qeyseri, Havza, Pil Kopru, Canîk, Şarkî Qerehisar, Çanqiri, Çawlî, Çorûm, Amasya û Enqere û der dorên clin heytînin. Keça serokê Enqerê ya bi navê Gulnoş Bano yê ji xwe re dike. Di van bajaran de bira û pismamên xwe kirine serdar û serok. Kurdên li wan deran jî bi vê yekê kefxweş bûne, Wek mînak li Kemahê birayê Danişmend Mangug (Mengûc) hakim e. Di sala 1072 an de, serleşkem Siltan Melîkşah, Emîr Artûk piraniya Anatoliya Navîn heyna. Emîr

Danişmend jî dora Kizilirmak, Kelkît û Meletî heyna û Mîrîtiya xwe fireh kir/117'4’ Di sala 1084 an de dimire; di şuna wî de, kurê wî yê bi navê Melîk Ulmeddîn Gazî Gumuştekîn bû serokê hukumetê. Wî serokî, bûka Qiliçarslan revand û li biraziyê xwe mar kir. Li ser vê bûyerê Prof. Tûran dibêje: Hukumdarê Erzirûm

Îzzeddîn Saltûk (?- 1168) bi Siltanê Sdçûcjıı/an Arslcın-Şah û Şahe Axlatê Sökmen re îttîfaq kir û Curd têk birin. Îzzeddîn dixwest keça xwebide Kiliç Arslanê 11 an û derbast tabîiyeta un bibe. Bi ser vê de qîmeta xwe di gave, dranên xzve de ket. Wext a keça id di M de tî re derbas dibû (1165) dijminê Kiliç Arslan, Yaxibasanê hukumdarê Sêwasê if ji Danişmendan keçik rêvand.m Îhtîmalek heye ku Danişmend koka Reşiyan an jî ya Milan bin, lewra gelek êlên Reşî di dema fetîhkirina Anadolê de hatin û bi taybet jî dora Sêwasê mirîtî avakirin û piştre jî dîsa vegerîn Xorasan û dora wir. Di belgeyeka Osmanî de îşareten vê hene. Mümküne herdû konfederasyon di bin sîwana Danişmendan de gîhiştibin hev. Gelek êlên Kurd, di bin navê Tirkmenên Danişmend de derbas dibin. Wek mînak: Kurd Mehmetliyê girêdayî Welî Kethüda, Qere Kurd cemaatı ya girêdayî Koca... Vanê H sencaxa Balikesîr li günden Omer, Sû Sigirligi, Vîran Han, Tîmûr Kapiyê îskan bûne û li wir fesadî û şiddete bi kar tînine. Ew ferman di sala 1103 (1691) derketiye.(99'14/89'15)

Di pirtûka bi navê "Riha Haçli Kontlûxû" de jî tê ragihandin; ku di sala 1100 an de Danişmendiyan erîşî ser Ermeniyên Meletî kirin û di sala 1103 an de bajar ket bin desten Danişmendan. Di heman sale de Boûdoûîn du Boûrg çû ser Sûrûçê. Xelkê Sûrûçê bi Tirkan re îttîfaq kir, lê Tirk ji ber revîn û xelke bajêr di şûr re hate derbaskirin; jin li bazaran hatin firotin û xwîn herikî. Saleke bi şunde, Sökmen ciisa hat ser Sûrûçê, lê Kurd ji şer vekişîn û Sökmen jî newêrî here ser bajêr. Di sala 1103 an de jî Frankan li Helebê xelke misilman kuştin. Dîsa di heman demê de erîşî ser Mêrdîn, Rakkayê

kirin û kelehên di deste Bed ran de girtin û keriyên pêz birin û xelk kuştin. Sökmen tê al ika riya Bedran, Frank têk birin lê Bedran dîl dikeve. Li dijî peşveçûna Xaçperestan Sökmene Tirkmenî xwedî 7 hezar siwarî û Çokûrmûşe (emîre Mûsil û Nisêbînê, küre xwt' Zengî ye) Kurd yê xwedî 3000 siwarî nakokiyên xwe didin alîkî û îttîfaq dikin.(20)

Rom û Selçûqiyan bi hevre îtîffaq kirin ku dawiyê bidin hukumeta wî. Ji sala 1134 an heta sala 1142 an tim şer di nava wan û Selçûqî û Roma de derdiketiye. Di gava serok Melîk Nizameddîn Yaxibasan de komele bûye du beş. Di nava wî û birayê vvî yê bi navê Melîk Eynîddewle de û wî aliyê Meletiyê kiriyê dest xwe. Gor Tûran dinivîsîne, di sala 1164 an de Yaxibasan dimire û Kiliç Arslanê II an welatê Danişmendan dagir dike.{43) Vê demê li Ezinganê mîrîtiya Mengûcikan; li Erzirûmê jî kurapê wan Cîhan Şah hene û Deryam Şah giredana xwe bi Kiliç Arslan re diyar dike. Bi hatina Moxolan re Siltan Aladdin Keykûbad dixwaze sînorên xwe û Moxolan bi hêztir bike. Ji bo vê, ji mîrîtiyên Kurdên li Erzirûm û Ezinganê ditirse ku ewê bi Moxolan re bibin yek û xwest wana ji holê rake. Di sala 1228 an de Ezingan û Kemah heynan û ew xanedana kevn bi dewleta Mengûcan ve ji holê rabû. Şaxâ Mengûcan ê li Dîvrîxî yê diiêj ajot. Kiliç Arslanê II an sala 1175 an de Sêwas û welatê Danişmend bi temamî heyna şûnde, Rûkneddin Şah Silêmanê kurê Danişmend ji bo birêvebirina Dîvrîxî tayin kir. Ji hilweşandina Mengûcan şûnde dewleta Eretna dest pê kir.

Taybetmendiya mîrîtiya Danişmend ev e, ku serok û revebiren ji alî gel ve ne dihatin pejirandin, ji text dadixistin û di şûne de yekî din hildibijartin. Wek mînak di sala 1164 an de Hamîd Cemal davêjin û li şûne kurê apê wî Melîk İbrahim (1166) tînin. Şemseddîn İsmail davêjin li şûnâ apê vî Nasreddîn Zulnûr (1168) tînin.

Di sala 1174 an de Selçûqiyan Sêwas heynan û mîrnîşîna cîranê xwe di sala 1180 an de ji hole rakirin. Riha ji heynan û dixwestin bigihîjin

Gurcîstanê. Hukumeta Meletî ji di sala 1171 an de ji alî Selçûqiyan davvî lê hat dayin. Tirk û Ermeni dibêjin ew ji me ne, lê ne raste.

Ihtîmalêka mezine ku berdewamiya Danişmendan yek jî ela Qerekeçîliyên îro tênî nasîn in. Ela Kutabana girêdayî Şexane Qerekeçîlî di nav Danişmendan de navê serok êlekî ye. Dîsa navê Gökçe bi Cerabana vê girêdayî jî di nava Danişmend de xuya dikin. Heta nîşana Qerekeçîliyan "X" di heman deme de ya Avşara ye jî.<"-23> Şexan/Şexika, îro li Anatoliya Navîn jî xwedî çar gundan in û girêdana wan bi Milan û Kerekeçîliyan ve heye. Ji bilî wan, li Xorasanê jî ew êla heye û şikle wan jî dişibin hevûdu. Rastiyek jî heye ku di van şertan de jihevkirina ew êl û zendêna gelek zor e; gor texmîna min ew nêzîkî Milan xuya dikine. Heta mirov têkiliya wan û Germiyaniyan jî meraq dike, geio ew herdû jî yekbûn?

ERETNA

C. Turkay dibêje dewleta yekemin a misilman e, ew çiqas raste em nizanin. Lê îhtîmaleka pir mezine, ku dameziranêrê wê dewletê Qadî Burhaneddîn ê Kurd e. Li ser koka wî Sumer wiha dibêje: Ew ji êla Oxûz a bi navê Salûr bû; kalê wî yê pêncan ji ber Moxolan ji Harîzmê hatibû Anadolê.(13] 184) gotin ku cara yekemin ew hatine; ji ber Moxolan reva wî jî wek êlên din en Kurd rastiyeke dîrokî ye. Eger ji ber Moxolan reviyabe wê demê ne êla ku cara yekemîn hatiye Anadolê ye. Lewra berî wê jî êl hatibûn. Prof. Yucel jî dibêje: Malbata Qadî Bûrhaneddînî (1345-) ji Harezmê hatiye Qestamonû û ew li Qeyseriyê tê dinyayê.(35) Koçaş jî dibêje: Li Anî yê çêbû, bave wî Tirk, diya wî jî Kurd e.{49) Hinek nivîskar dibêjin ew: Di navbera salên 1335 1381 an de li Anatoliya Navîn jiyaye. Eretna, di sala 1343 an de peşniyaza Çobaniyên li Ezerbevcanê ku roj bi roj bi hêz dibûn red kir û heta rojhilatê Qerehîsarê talan kir û bi mûtefîkê xwe Qeremaniyan ve Enqerê heynan.pl156) Çobaniyên ku tên gotin

Beranî ne (Qerekoyûnî) ku ew jî Kurd in û li dora Erzirûmê desthilatdariya xwe fireh kirin. Ittîfaqa wî ya bi Qeremaniyan ve jî balkê§e. Lewra Qeremanî jî Kurd bûn û li Qeremanê desthilatdar bûn. Niqta din a girîng jî ew e, ku di nav gundên Qerekeçiliyan de gundê Salûr jî heye. Bi vî awayî têkiliyeka Eretna û Qerekeçîliyan derdikeve hole.

Di bin desthilatdariya Alaaddîn Eretna de, bajarên mîna Sêwas, Qeyserî,

Nîxde, Tokat, Amasya, Ezingan, Qerehîsar, Niksar, Canîk, Dewelî Qerehîsarê girêdayî dewleta Eretna bûn. Eretna bi Dulqadiriyan ve tevhev waliyê Meletiye yê girêdayî Memlûkan, Esendemîr Tazı têk birin. Memlûkan esker şande ser wan lê tiştek nekirin.(3M57) Di dema vî şerî de, Eretna bi Dulqadiryên li başûre welatê xvve re îttîfaqê dike ku ew jî Kurd in. Dulqadirî şaxekî Reşiyan e, yan jî Reşî bi xwe ne û têkiliya vvanherdûyan heta roja îro jî li ser dostaniyê berdewam e. Yanê ne êlên ji hev dûr in, berovejî gelek nêzîkî hev in. Ji aliyê din ve Kurdan di nava xvve de jî şere hev dikirin. Heman nivîskar dinivîse; ku di sala 1365 an de emirê Amasya Hecî Şadgeldî, Mehmet Begê Eretna li Qeyseriyê (hinek jî dibêjin Sêwas) kuşt û di şûna wî de kurê wî da ser mîrîtiyê.(3M58) Şadgeldî j i konfederasyon-dewleta Şadî bû ku Kurd in. Mümküne ku di navbera wan de pirsgirekên sînoran û fireh kirina wan hebe. Lewra, li jor jî me qala Beraniyan kir, ku ew li dijî firehbûna Eretna derketibûn.

Prof. Yaşar Yücel jî dibêje: Bi taybetî jî erîşen Qerece Begê Dulqadirî li ser bajarên vê dewletê gelek bûn û Memlûkan jî piştgiriya wî dikirin. Di dema kurê Eretna Mehmût, kurê wî Alaaddin de ji ber êrî§ên Tirkmen û Moxolan gelé koç kir. Beşek jê çû rojava, beşek jî çû Heleb û Dîlokê. Di vê demê (1365¬1380) de emîrê Amasya Hecî Şadgeldî, yê Sêwasê Hecî Ibrâhîm, yê Qeyseriyê Qadî Bûrhaneddîn û yê Ezingan (Erdîcan) ê jî Mutahharten e. Bi dîtina me gelek ji vana Kurd in û gelek caran bi hev re şer û îttîfaq kirine. Di sala 1367 an de Tirkmenên Şame (di gelek jêderan

de ji bo Kurdên Anatolî yê te bi kar anîn) û Dulqadiriyan erîş kirin û Pinarbaşi heynan. Osmaniyan jî Enqetê heyna bûn. Di vê sedsalê de bi taybetî di nav 50 salî de gelek şer û pevçûn di navbera wan de derketin. Yek caran Tîmûr, Osmanî û Memlûkî jî beşdarî wan şeran dibûn. Ji wan serokên bihêz yek jî Qadî Bûrhaneddîn e.(3s) Qadî, paşe dibe mîrê Amasya. Ji hilweşandina dewleta Eretna şunde derbasî serokatiye dibe û dewleteka bihêz ava dike. Têkiliyên van emîrana bi hevra pir balkê§ in. Mirov dikare bêje wek têkiliyên Kurdan yen îro ne. Wek mînak: Qerecê Dulqadiriyan, bi piştgiriya Memlûkan erîşî dewleta Eretna dike. Paşe waliyê Helebê Boxarus Beg li hember Memlûkiyan serî hildide û Qerecê re alîkarî dike. Piştî vê bûyera bi ser neketî Qerecê xwe davê paş Mehmedê Eretna û ew jî li dijî zora Memlûkan mecbûr ma ku teslim bike. Di sala 1353 an de li Qehîiê te kuştin. Dema bi Elî Beg re ârîşî Erdîcan kirin, emîr Mûtahharten ji Dulkqadiriyan (Ibrâhîm Beg) û emîrê Pezgewra Kûtlû alîkarî xwest (1379). Dulqadirî bi hêzeka mezin hatin. Di sala 1380 an de desthilatdarê Amasya Hecî Şadgeldî yê Danişmendî bû û di navbera Toqat û Sêwasê de jî cîhekî bi vî navî heye. Şadgeldî di sala 1379 an de ji alî Qadî ve tê kuştin. Di vir de tişte ji bo me balkeş e ji alî Prof. Yucel ve tê dest nîşan kirin: Di bihara sala 1383 an de Tirkmenên Moxol û yên Şaır^ dema derketin zozanan, hatin huzura Qadî û girêdana xwe jê re diyar kirin. Di heman demê de xwediye Qeyserî kurê Ömer jî gilî kirin û xwestin bila Qadî Qeyseriye heyne. Bi xwe jî ji bo alîkariyê

amade bûn. Qadî razî kirin, lê serdarê Ezinganê ji rojhilat de tehlike nişan dida û Tirkmenên Şame ji her demê zêdetir ji bo Sêwasê tehlûke xuya dikirin, ji ber ku gelek bûn. YVana di bin fermana serokê xwe de, ji Gazza heta Amedê bi dh bûbûn. Di jêderê de, ew bi navê Tirkmenên Şam, Heleb û Kasrı wane dihatin nasîn. Zivistan li Helebê, li Uzûnyayla û başûre Sêwasê û li cîhen din ji diçûn zozanan. Ji wan re Şam Tirkmenî (mile

Bozoklû) dihate gotin. Qadî, ji bo ku bikaribe li Anatoliya Navîn bisekine, dixwest; şervanen wan qebîlên ku li çiyayên Sêwasê heta Derya Spî dijin qontrol bike. Li destpêkê bi şeweyekî aştiyane çû ser wan, lê nebû. Elçi ji wan re şand ku bila sînorên Sêwasê terk bikin û bacê bidin. Wan qebûl nekirin û şer kirin, têk çûn û Qadî gelek xenîmet ji dest wan girt.<35>

Bi qasî tê qalkirin, Qadî Bûrhaneddîn serok dewletekî gelek egîd, bi biryar, bi aqil û xwedî §êxsiyet bûye. Têkiliya wî bi êlên dihatine zozanên Sêw'asê re baş bûye, ku îhtîmaleka mezine ew Reşî ne. Lê di bin sîwana dewleta wî de kijan êl û federasyon hebûn? Ew pirsa hîna jî li bersiva xwe digéré. Wekî gelek nûser jî dinivîsînin: Bi hêzbûna Osmaniyan a li rojava û bi hatina Tîmûran ji rojhilat ve, ew dewleta hanê zêde nikaribû bijî û piraniyan wan dîsa vegeriyan iranê.

Di sala 1388 an de artâşa Memlûkan bi hêzeka mezin erîşî Qadî kir û heta Sêwasê hat. Di vî şerî de élan jî, ji Qadî re alîkarî kirin û artâşa Memlûkiyan şunde reviya. Ji wî şerî şunde Yelboxa (Heleb), Mintaş, Sûlî Begê Dulqadir, Qadî Bûrhaneddîn li dijî Berkûk ê Memlûkî îttîfaq pêk anîn.

Di sala 1397 an de êlên koçber li dijî dewdeta Qadî Bûrhaneddîn (Sêwas) û Qeremaniyan hevkarî kirin, di şer de têk çûn û aman xwestin û Qadî ew li dora Qeyseriyê bı dh kirin. Di heman demê de Memlûkiyan ji tirsa Tîmûr elçî ji Qadî re şandin. Berkûk di nameya xwe de: Artâşa Helebê di emrê te de ye. Tirkmenên Şamâ (Kurd) jî di bin îtaatê me de ne û nikarin êrîçî sînoren we bikin! Digot.(35) Bi vî awrayî dixwest piştgiriya Qadî bike û ji alîkî ve jî bi wî bide xuyakirin ku gelek êlên herêmî û êlên Kurd jî li pişta wan in. Lê ji bo dewleta Eretna tehlûke ji herdu aliyan ve dihat, ji rojava ve hêza Osmaniyan roj bi roj zêde dibû û ji rojhilat ve jî Tîmûr bû. Piştî salekê Osmaniyan dawî li desthilatdariya Qadî anîn û Tîmûr ji bo serok mîrîtiyên li rojavayê yên ji ber Osmaniyan reviyabûn jî bû hêviyeke nû.

Dewleta Qadî Bûrhaneddîn di sala 1398 an de ji hêla Osmaniyan ve hate rûxandin. Qeremanî jî di sala 1397 an de ji holê hatin rakirin. Bi hatina Tîmûr re serokên mîrîtiyên li Anadolê yên ku reviyabûn, Tîmûr wek rizgarvan dîtin û li dora wî civiyan.(82) Ji vana yek jî serokê Qeremaniyan bû. Tîmûr, dijminê Qadî pirs dike û yek jî dibêje: Serokê Ezîngan Mûtahharettîn xwedî pêne hezar, Qereman 10 hezar, Nîksar-Çelebî şeş hezar û bi hinekên din re jî dijmin in. Muxalîfên xwe jî Moxol, Tatar, Anted û Tirkmenên Şamâ jî 20 hezar in gotiye.(3M65) Bi vî awayî hêz û kudreta Qadî derdikeve holê, ku bi weqas hêzan re têkoşiyaye.

QEREMANÎ/AVŞAR

(Avşar: Atma, Oxcû, Sine Milî ne)Têrikî û Celikî)

(1256-1487)

Peyva Qereman ji Erebî tê, Tirk jî vê bikar tinin û ketiye nava kürdi jî; di zimanê me de bi piranî di wata mêr, egîd û bêtirs tê bi kar anîn. Bi vê re girêdayî, binek jêderên Ereban jî dest nişan dikin, ku ew navali mirovên natirse ku li Erebîstanê şer dikire (îhtîmaleke ku Kürden di nava arteşa misilmanan ji vê êlê re) re "qehreman" digotine. Hinek nûserên Tirk(311)jî îddea dikin; ku Qeremaniyan ji ocaxên komirê, komir tanîne Ermenek-Qonya û ji bo rû û kincên wan reş dibûne ji vê re gotine Qereman (mêrê reş). Lé bi ditina min, ji ber mêrxasiya wan ew nava li wan danîne. Dibê ku navê Reşiyan, Tirkan zivirandibe tirkî û gotibin mêrên-re§ yani qereman jî. Herdû alternatif jî bi mêraniyê ve giredane û Qereman hîna jî serbilind û bê tirs in. Min li Xorasanê konên wan ziyaret kirin, wextê te li çavên wan mirovan mêze dikir te didît ku ew mina baz û şûran in...Tirs di çavên wan de ti caran xuya nake.. dema pêvajoya wan ê dîrokî û bûyerên li dora wan qewimî jî mirov tine ber çawan, ew îddea rasttir xuya dike...

Gor dîrokzanê Tirk: Êla Qereman girêdayî zenda Avşar ê ji Oxûzan e.(11' 11 F. Sumer, ji devê gelé Qereman wiha radigihîne: Xanedana Qeremanan di wê baweriyê de ne, ku ew ji Oxûz-Xan hatine û birayekî Qeremanî bi navê Oxûz jî hebû.(131,88) Yazicioglû dibêje: ew ji Avşaran in, îhtîmaleka mezine ku raste. Di Selçûqnamê de wiha dinivîse: "Qereman oğlanları Avşar boyundan erinin tarafına düşen Etrakun Ulu ve oğulları duru//Kurên Qehremanên ji zenda Avşaran, li alî Etrakûnê mezin û küren wî dikeve."(1ll'l8l) Bi dîtina min jî, di nav van îddean de para rastiyê zêde ye. Lewra Avşar buna \ê komê îhtîmaleka pir mezine û girêdana wan ê Oxûzan jî bi wata em didin Oxûzan raste; Ji bo ku Oxûz, berpirsiyarê kalên Kurdên koçber gişti bûn. Yan jî mirov dikare bibêje serokê konfederasyonê bûn. Dema min di zanîngehê de dixwend hevalêkî min ji Amîka Hatayê hebû ku ji êla Avşaran bu û te digot qey ew parçekî ji min bû. Yanê di navbera me de, ji ti aliyan ve cûdahî û ferq tunebû. Ji alî fîzîkî, ziman, hest, mêranî, dostanî, arangî(henek) û hwd...Lê ne dûr e ku Qeremanan ew nava ji hatina xwe ya Anadolê bi şûnde girtibin. Yanê ji ber Tirk û Moxolan reviyan û hatin Anadolê bi şûnde ew nav heynan; navê berê çi bû? Avşar an navekî din bû? Ew lêkolînên kûr dixwaze...

Uzûnçarşili dibêje dema li rojava bi cîh bûn, beşek jê di sala 1228 an de - dema Alaaddîn Keykûbat I an- li Ermenekê-Qonya bi cîh bûn. Di heman salé de serokê êlê, Nûrê (Nûrê Sofî) kurê Sadûddîn e û kurê wî jî Kerîmûddîn Qereman e (?-1261). Ermenek heynan bi şûnde navê bajarê Kamerûddîn Qereman lê danîn.(3M) Kurê Nûreddîn Sofî Qereman navê xwe da malbatê.031 I81) Xuyaye ku navê êla wê demê guhartine yan jî êdî êl bi navê vî serokî hâtive xwendin. Lewra di nava Kurdan de ew kevneşopiyeke; eger serokê êlê

mirovekî hêja, bêtirs Ci bi nav û deng be, êl bi navê wî tê nasîn û zanîn; ew ne seyr e. Uzûnçarşili niqteyeka din ê balkûş jî radigihîne: Ji vê êlê beşekî em di nava sedsala XII an de li Mevaraûnnehr û beşekî din jî em di dema Beranî avabûn de li Ezerbeycanê dibînin.(3111 Di nava Kürden navenda Xorasanê de, bi hatina Tirkan re parçebûnek em dibinin; mümküne ku sedemên olî jîkiribin, le di serdema Tirkan de ew eşkere xuyadike.. Beşa li Mevaraûnnehr jî piştre tê Loristanê û hinek ji wan berbi Arran ve çûn û hinek jî hatin Anadolê. Lê dibe ku ew li Qonyayê jî beşek gîhiştibe yen Arranê û tevhev Beranî avakiribin. Kola wan di avakirina Sefawiyan de jî heye. Liser tarîxa Avşaren li Loristan Sumer wiha dinivîse: Di salên 1135-1136 an de gelek Tirkmen li Xuzîstanê dijîn. Gor "Vasedsalaaf" radigihîne, Avşar û Salûr ji Deştî-Kipçak (Seyhan) ê hatin Xuzîstan û Kuhê-Gîlûyê; gereg hatina wan hinek berî vê tarîxê be. Wê demê Yîva jî li Şehrîzor dijîn, Mümküne ku bihevre hatibin. Serokê Avşaran Yakûbê kurê Arslan hebû, piştî wî jî Şûmla hat. Di dema Şûmla de Loristana biçûk jî kirin bin destên xwe. Xelîfê Bexdayê xwest di sala 1155 an de Şûmla têk bibe lê wî artê§a Ereban belav kir. Sala 1159 an de Melîk Şah Şûmla têk bir.(131-271> Wekî tê zanîn di nava êlên Kurd de yeka bi navê Şamlû heye ku niha h Xorasanê bi heman navî dijîn. Ew êla dibêjin ew pismamê Sêvikanî ne, yan jî yek êl in. Herdû jî girêdayî Reşiya ne. Ne dûre ku navê vê êlê ji wî serokê Avşaran Şûmlû hatibe û ewr jî têkiliyên wan herdûyan derdixe holê. Heman nivîskar dibêje: Avşaran ji 40 salan zêdetir mirîtî kirin û di damezirandina Dulqadiriyan de jî cîh girtin.'131299) Li peş emê qal bikin lê dibc bê gotin ku di navbera Dulqadiriyan, Sêvikan û Reşiyan de jî tekilî hene; ji têkiliyan zêdetir heman kok in...

F. Sumer li ser hatina Qeremaniyan ya Anadolê dibêje: Ihtîmaleke ku bi êrî§ên Moxolan re Qeremanî cara yekemin ji Arranê hatin Sêwasê; li wir beşdari serhildana Bav Isheq bûn û piştre ji çûn dora Ermenekê. Li dora Mersîn-Îçelê bi Ermeniyan re ketin tdkoşîne û gor Aksarayî jî, bi Selçûqivan ve ketin şerekî (1261) pir bi xwîn. Gor Yazicioglû jî Qerêman ji Avşaran e; bi rastî jî gor dîroka Ermenî ya anonim a ji sala 1300 an mayî de tê gotin; ku serokê Avşar Islam Beg di sala 1254 an de li peravê Isorya bajarê Cracca (Kiz Kûlesî- Silifke/Mersîn) talan kir.(l31-2741 Sumer dibêje: Wexta Baybars hate Anadolê, kurê Qereman Mehmet jî erîşî (1277) ser Qonya kir.(131"181) Mehmet Beg Qonya heyna û şehzadeyekî Selçûqî yê bi navê Cimrî derxist ser text û bi xwe jî bû wezîr. Di cîvînê de biryar girtin ku ji vir û pê ve, di nava qesr û civînan de ji tirkî bêtir ti zimanên din bi kar neyên; tê fêhm kirin ku zimanê hatiye qedexekirin jî farisî ye (131-181) pw zimanê hatî qedexe kirin kurdî ye ne farisî; lê tiştê mirov fêhm nake ew e, ku serokekî weqas bi hêz çima destur dide, ku kurdî bê qedexe kirin? Dibe ku agahiyeka bê bingeh, ya jî berovajiyê vê be jî; yanî tirkî qedexe kiribin...Di dîrokê de gelek caran tê rasthatin ku di pozîsyonên wiha de Kurd xwe didin paş, ti caran nabin serok yan jî §exsên peş. Di bûyera Eba Muslimê Xorasanî de jî me qala vê kiribû. Xeleka din ê balkê§ Mehmed Beg ê bi wezîr Fahreddîn Alî yê ku Tirkmenan biçûk dibîne re şer dike û zora wî dibe; lê bi hatina Moxolan re ew vekişî Mersînê.(131"181) Berê jî min gotibu Tirkmen di wata Kurdan de derbas dibe, wezîr jî Kurdan, bi gotineka din nijada Mehmet Begê biçûk dîtiye û ji bo wê şer derdikeve. Ew ji Kurdbûna Qeremanan re îspateka din e. Gazan Xanê Moxolî ji bo Kurdan wiha dibêje: Eger ew Tirkmen û Qeremanî nebiyana, hespên Moxolan heta cîhê ku roj lê diçe ava her in.(13M8l) Li ser şere Moxolan Uzûnçarşili jî navekî cûda dide: Serokê Nîxde Şerefeddîn Hatir li hember Moxolan serî hilda, ji Qeremanan

Mehmed Beg jî alîkariya wî kir. Li hember vê Tirk bi Moxolan ve bûn yek û Hatir îdam kirin (1276) lê Mehmed Beg tekoşîna xwe berdewam kir. Di sala 1277 an de bi sê hezar siwarî Qonya dorpêç kir lê nikarî bigire. Têkiliyên Memlûkan û Qeremaniyan ya wê demê baş in. Paşû Qonya heyna, lê, yekî bi navê Giyaseddîn Siyawûs gote ez kurê Îzzeddîn im kirê Hükümdar. Moxolan pa§ê Mehmed Beg di heman salé de kuştin.(313)

Di hêmû jêderan de qala mêranî û şervaniya Qeremaniyan tê kirin, komeka pir şer van bûye û ti hêz nedikariye xwe li hember bigre. Di nava Selçûqiyan de jî vê tirsê em dibînin û gelek caran di nava Osmaniyan de jî tê dîtin. Kiliç Arslanê IV an ji ber vê tirsê, birayê Qeremanî bi navê Bûnsûz (1256) wek rehîne anî qesra xwe û berpirsariya qesrê dayê.<312) Di nava gundên li Anatoliya Navîn de, gundekî bi vî navî girêdayî êla Nasûrli heye, dibe ku navê xwe ji wî begî girtibin.

Di dema Osmaniyan de, di navbera mîrîtiyên Kurd û Osmanî de bûyerên balkeş diqewimin. Ew bi serê xwe babeta lêkolîn û têzên doxtoriyê ye...Osmaniyan ji bo firehkirina dewleta xwe her rê bi kar anîn; yek ji wan, ji

muxalîfên xwe yan jî hêzên mezin keç kirine bûk û bi vî awayî erde qezenc kirine. Li ser vê babetê Mûftuoglû dibêje: Mûratê I an li Anadolê di alî yekîtiya Tirkan de gavên girîng avêtibûn. Di vê navbera de Akşehir, Yalvaç, Beyşehir, İsparta, Seydişehir û Qerexaç bi peranji Hamîdogûllari kiri. Lawêxwe Yildirim Beyazîd, bi keça begê Germiyan Silêmanê bi navê Şah Dewlet re zewicand û Kütahya, Simav, Emet û Tavşanli wek qelenê bûkê tevlî welatê xwe kir. Di vê navberê de tekoşîna Qeremaniyan ya li hember firehbûna Osmaniyan berdewam dikir û li deşta Qonyaye, di sala 1387 an de, di du saetan de ew bela berteraf kir.(133'12) Kêmasiya Kurdên wê demê herî mezin ew e ku axa welatê xwe wek qelen dane;

yan jî bi hêsanî dest ji war û axa xwe berdane. Jî ber vê sedeme jî nebûn xwedî tiştekî; belav bûn û tenê ji gelên din re dewlet damezirandin.

Derba herî mezin ji alî zavê Kurdan Yildirim Beyazıt ve li Kurdan ket. Wî mirîtî û dewletên Kurd yek û yek ji holê rakirin; yan kirin bindestê xwe yan jî ji rojavayê Anadolê avêtin. Yildirim bi Sirban re (Kosova) aştî kir û erişi mîrîtiyên Anadolê mina Aydin, Menteş, Germiyan, Sarûhan kir û di dawî de jî çû ser Qeremaniyan û Qonya dagirkir. Li hember vê Alaaddîn Beg ji Candaroglû yê Qestamonûyê û Bûrhaneddînê Sêwasê alîkarî xwest; herdû jî heta Kirşehre hatin û bangî Qereman Beg kirin lê ew neçû. Alaaddîn, dema Yildirim li Rûmeliyê bû erîşî Enqerê kir û heyna. Beyazît jî bi 170 hezar leşker çû ser, yen Qeremanan 70 hezar bûn. Li Qonyayê şer kirin lê herdû alî jî bi serneketin. Pa§ê, Osmaniyan 30 hezar şandin pişta wî û ew têk birin. Beyazît di sala 1398 an de dawî li Qeremaniyan anî. Lê Mût, Ermenek, İçel û Taşelî di destê Şex Hesenê Qeremanî de man.(3M6) Bi şere Osmaniyan re jî hêza Qeremanan diyar e, li hember 170 hezarî vên Osmanî ew tenê 70 hezar bûne, dîsa jî nikaribûne wan têk bibin. Li hember Osmaniyan rêberên Qeremaniyan li îttîfaqan jî gerîne, ku ya herî girîn îttîfaqa wan ê bi Kurdên li Sêwas û Qestamonûyê re ye. Eger bigîhiştana hev, îro ihtîmalek bû ku ew li Anadolê desthilatdar biyana.

Ittîfaqa din ê balkâş jî ya bi Xaçperestan re ye: ew hewldana jî nîşan dide ku Qeremanî ne misilman in. Ya jî mirov dikare bibêje misilmantî pejirandibin jî, praktîka wan li dij e. Lewra Osmaniyan di her demê de bi navê Islamê ew firehbûna xwe pêk anîne. Di salên 1442 an de em dibinin ku Ibrâhîm Begê Qeremanî bi Xaçperestan re, li hember Osmaniyan dikeve îttîfaqê û bi vê re Qeremaniyan Enqere, Kütahya, Afyon, Bolvadin, Beypazari, Hamîdelî şewitandin,(31'251 Li ser ola Qeremaniyan ev hevoka jî gelek agahiyan dide: Gor dîroknûsê wê demê, ji Qeremaniyan re "Qizil borklû û ayaxi çarikli-Kum sor û ling bi çarix/kaloş" dihate

gotin.(13,181) Ew kumsorî dê piştre bizivre, Sersoritî-Qizilbaşîtî yê. Siltan Mûrat bi Xaçperestan re aştî kir û hemû tola xwe ji Qeremaniyan re veşart. Cîhên ku tê re derbasbûyî kevir li ser kevir nehîşt û dest dirêjiya jinan kirin. Ji Qeremaniyan re Akşehir, Seydîşehîr, Beyşehrî hîştin.(31'26> Di vê navbera de Ibrâhîm Begê Qeremanî bi elçiye Venedik Mocenîgo re peyman çêkir.<31'29) Osmaniyan li hember xaçperestan boça xwe

danî, lê Kurd di komkujiyan re derbaskirin. Ji vê yekê jinan para xwe stendibe jî, Qeremaniyan ti caran paşve gav navêtine. Ew tekoşîna bi Osmaniyan re, di dema Pezgewran de jî dom kiriye.

Li Anadolê ji bo Osmaniyan pirsgirêka mabû Qeremanî bûn; pêwîstbû ji bo wan ew çareser bibe, lê ew pirsgirek bû sedem ku Osmanî bi Hesenê Dirêj -hakîmê Iran- re bêne hember hev. Desthilatdariya Qeremanî ya li navenda Anadolê di sala 1468 an de dawî lê hat; lê tekoşîna begên Qeremanan li Torosan hîna jî berdewam bû. Ew yeka bû sedema nexweşiya navbera Memlûk û Osmaniyan jî. Dewleta Hesenê Dirêj ji konfederasyona élan pêk dihat û dix west bibe Tîmûrê duyemîn. Di sala 1472 an de artâşa Qereman û Pezgewran Tokat bi erdê re kirin xalî bi şûnde, êrî§ê Akşehîrc kirin.(82) Pezgewran, ji Pîr Ahmet û birayê wî yê Qeremanî re, di fermandariya Zeynel Beg de artâşeke ji 30 hezar kesan pêkdihatî şandin. Lê di sala 1472 an de Osmanî di şer de bi serketin.(3133) Qeremaniyan xwestiyê ji nakokiya herdû hêzan sûd werbigrin, lê ew jî biser neketiye.

Jêderên Tirk dibêjin ku: Qeremanî ji sala 1327 an heta 1417 an serbixwe bûn. Ji wê demê bi şûnde ketin bin destên Memlûk, Osmanî û Tîmûr.<3137> Lê çima ew heta 1200 naçe? Mirov fêhm nake; lewra wê demê jî Qeremanî ne girêdayî tu hêza bûn. Zagonên Qeremaniyan mukemel bûn û defterên xwe yên erdê hebûn. Şahabettîn Omerî radigihîne ku Qeremaniyan 25 hezar siwarî 25 hezar jî eskerên xwe yên

piyade hebûn.(31'37) Li Xorasanê bajarê Bicnûrdê di muza Şadiyan de defterên erdê wan jî hebûn. Dîroka siyasî ya Qeremanan di sala 1475 an de qediya.<S99) Ji vir şûnde jî mirov dibîne ku dewleta Sefawî tê avakirin û di bingeha vê dewlete de jî Qeremanî hene. Ku kumên sor ji vir pê

A «A t »t • /—»AA , A

ve ji bibin şııtı...

Deftera erdên Qeremanî

Gor Şîccarî dinivîse: Kurdan rojekê erişi Qonya kirin û ji kurên Xelîl serê 24 şehzadan firandin (I. H. Qonyali-Nîxde Aksaray Tarihî). Paşe Kurdan dev ji erîşan berdan. Piştî salan, di sala 1655 an de, di nava bajarê Qonya de tevgereke muxelif ava bû û Mehmedê Kurd serkeşi dikir û dix west bajêr biparêze. Di sala 1655 an de Seydî Ahmet Paşa bû mîrêmîran ê Qeremanê, lê ji ber zilmên wî yen bere, gelé bajer ew nekirin nava Qonya. Mehmedê Kurd bi 3000 sipahivan ve li bajer ma û xeber ji Ahmet re şand ku bila nekeve bajêr. Şer derket, dewletê ew şandê Helebê.(i26'41) Ew jî baqiyê Qeremaniyên ku li Anadolê desthilatdariya Osmanî naskirî û di emrê wan de mane. Di nava İzolen li Serînde de 14 xanên Qeremaniyan hene, gor rîwayetê ew ji Qonya hatine.1'12M39) Qeremanên li Xorasan jî hîn bi navê xwe dijîn û piranî li dora bajarê Aşxan6 ne û hinek jî koçer in di konan de dijîn. Min herdû beş jî di sala 2003 an de ziyaret kiribûn.

Di nav vê dewlet-konfederasyonê de kijan federasyon yan jî êl hebûn? Pirsa herî zor ew e. Bersiva vê pir girînge, lê niha em dikarin tenê ji çend nûserên Tirk sûd werbigirin. Ela Tabanli, yan jî Bozûlûs havînan (1750) dihatin zozanên Kûrûca Çol a girêdayî Haymanayê û li Haymanê çandinî dikirin. Ji wê re "arazî î madûde" dihate gotin ku li gundê Çomakê ye.

Berên xwe jî ev in: Bûlaran, Qeremanan, Imanan, Ifrazan Imanan, Bayat û Şexan ne. Tabanli li: Aksaray, Çanqiri, Enqere û dora wir, Qeza Kureys-Qereman, Haymana û Bala hene.(160"156> Ji vê ditinê mirov derdexe ku Têrikî yan, têkiliya xwe bi Qeremanê re ji sedî sed heye.

Ela Cibran, ji Qonya, Qereman, Teke û Enqerê ji alî Yawûz Selîm ve hatin rakirin û li Kurdistanê hatin bi cîh kirin. Gor mezinên vê êlê jî ew di sedsala X an de ji Anadolê hatine Riha û Wêrançarê. Ji wir jî di rêbertiya Şah Si war de hatine Warto, Bûlanik û Karliovê. Hinek jî dibêjin: di dema Beyazîdê II an de, dema Osmanî bi êlên li Anadolê re şer dikir, padîşah êrî§î wan dike û ji Tekê ew diçin Rihayê.<127f>6) Ihtîmaleka pir mezine ku ew girêdayî Qerema¬nan bûn. Lê dikarin girêdayî Germiyan û yen din jî bin. Ew hîn zêde belge û lêkolînan dixwaze. Ji bo hatina wan ê Rihayê, dîtina duyemîn bi me hîn rastir tê. Di wê demê de divê gelek êlên Kurd çûbin Kurdistanê; yen 1İ wir jî rihetî nedîtibin çûbin Iranê. Tê fêhm kirin, ku Qeremaniyên dawî jî di dema Yawûz de hatine şand in. Tişte din ê balkâş jî; şaxân Cibranî yen wek: Sûvarogûllari, Şibilîogûllari, Araboy, Bilikî, Alikî, Memikî, Sincar û Teymûr beş dibin!127" 6S) Ji van Şexbİlb, hîna jî li navenda Anadolê gundên xwe hene û ew girêdayî Reşiya ne. Bilikî jî li Anadola Navîn hene ku girêdayî Reşiya xuya dikin. Niq- teyeka balkeş jî alî Bêrtiyan ve tê ziman. Bêrtî dibêjin: "500-600 sa! berê em li alî Qonya rûdiniştin. Ji ber şerb Osmanî û Qeremaniyan em çûn alî Riha yê. Havînan li çiyayên Şerefettîn, Bîngol û Karliova; zivistanan jî me li Rihayê der- bas dikir.{17"200)

CANDARIYAN

Şexbizin-Şivan-Qeren (1212-1478)

Yek ji êl yan jî zendê ku hatibûn Anadolê jî Candariyan in; mixabin li ser wan zêde agahı nînin, lê wekî min işaret pekin îhtîmaleke ku evv şaxekî ji Şadiyan veqetîne. Dema hatin Anadolê H dora Qastamonû, Sînop, Çanqiri

û Enqerê mîrîtiyê avakirine. Bi qasî mirov li pêvajoya wan ê dîrokî dinêre, xuyadike, yan jî ez texmîn dikim; ku ew kalên Kurdên Lek ên îro li Anatoliya Navîn dijî ne. Lê ew ne misoger e, dikare şaş be jî. Gor Prof. Uzûnçarşili radigihîne Candariyan li dora Qastamonû, Sînop û derdorên wir mîrîtiyan avakirin û bi eslê xvve ew Tirkmen in. Serokê xwe jî Şemseddîn Yaman Candar e 01-121) vVekî Kurdên din ewana jî wek Tirkmen binav dikin, em li vê yekê seyr namînin. Lê serdema hatina van Kurdan di dema Ebasiyan de, yan jî ji ber Tirk û Moxolan revîn hatin vir ne diyare. Gor tê texmîn kirin, ew li dora salên 1200 an de hatine, dibe ku ji ber Moxolan reviyabin.

Berî hatina Selçûqiyan, ew li dora Xoy û Ûrmiyê bi navê Kurdên Şivankaran dijîne. Li cîhê ku ew lê dijîn mirov mêze dike, Lek bûyina wan dibe îhtîmaleka zêde. Lewra ew ji başûre Kurdistanê heta derya Kesk belav bûbûn. Ji wan re Benî Şivankaran-Benî Şibankaran jî dihate gotin. Ku tê wata kesên karê şivantî dikin an jî kesên şivantiya karan bizinan dikin e. Iro ji wan Kurdan re li Anatoliya Navîn Şexbizin tê gotin ku nêzîkî hev e.

Di sala 1357 an de, Sînop û Qastamonû di destê Kurdên Candaryan de bû.

Di hinek jêderên Ereban de tê nivîsîn; ku ew ji bo sînorên misilmanan biparêzin hatin Anadolê. Eger ew dîtin rast be, ew di dema Ebasiyan de hatine. Dîsa di heman jêderan de tê gotin; ku Ew digihîjin Şibankaren Loristanê. Ew dîtina me rasttir dike ku koka wan li Loristanê bûye. Gava hatine li dora Qastamonû, Çanqiri, Sînop û Enqerê bi cîh bûne, navê wan ê berê li wan kirine û ji wan re gotinê: "Xoyan-Xoyli" (Tarix Dû welîl Islamiyê, Taqwîmê Meskûkatê Qedîm, Îbnî Bîbî, Tarîxê Kurd ve Meşahîr). Xuyaye ku nav ji alî Tirkan ve lê hatiye dayîn û bi tirkî tê wata kesên ji Xoyê hatine. Lê navê wan ê orîjînî bi zanistî nenivîsîne. Di sala 1212 an de

Husameddînê Xoyî di bajarê Qastamonû de hukumdariyê kiriye. Vê hukumeta Şibankaran li ser êrîçên xaçperestan, bi Selçûqiyan re tekiliyên xwe baş kirine. Kurdên Xalda jî hatine Qestamonûyê û ji Kurdên Xoyê baştir xwedî li xwe derketine. Piştî ku Osmanî hatine ser Menteşiyan û Germiyan, ew jî zanîne ku dê rojekê dor were ser wan û tekiliyên xwe ji Osmaniyan birîne. Di salên 1440 an de bi Osmaniyan re gelek şer kirine û paytextê xwe birine Sînopê. Di sala 1473 an de dawî li vê hukumdariyê tê. Di beşûn pûş de wek berdewamiya wan, lê di bin navê Lek-Şâxbizin de emê hewl bid in ku dîroka wan bişopînin.

Wekî me berê jî nivîsî: Di şere navbera şehzaden Selçûqî de, Yaman Candar piştgiriya G. Mesûd dikir; di şere pêk hatî de, Çandar artêsa

Muzafferûddîn Yavlak Arslan belav bû. Ji ber vê yekê Qastamonû û dora wê dan Çandaran.(3112l)

DULQADIRIYAN-ZULQADIRIYAN (1339-1521)

(Sewêdî, Avşar, Oxçû, Beydili-Milan, Zerikî, Têrikî, Bayat)

Bi hatina Tirk û Moxolanya berbi rojava re, Kurdên li navendaXorasanê, bi piranî reviyan Kurdistan, Anadolû Sûriyê. Ew derbeyeka mezin li rêxistina Kurdan xist, hemû belav bûn û berbi gelek cîhên cûda ve çûn. Hinek ji wan jî di nav gelên din de heliyan. Pişti rûxandina dewleta Şadî û Merwanî jî ew belavbûn hîn leztir bû. Li rojavayê Anadolê bi dehan mîrîtiyên Kurd hatin avakirin. Dîroknûsên Tirk ew wek Tirk nîşan didin, lê ew yeka ji rastiyê dûr e. Eger rêberekî bi hêz û bi biryar derketibiya û ew mirîtî wek Şadiyan di bin sîwana dewletekê de komkiribiya, îro Kurdên li Anadolê jî dê xwedî dewlet bûna. Wek tê zanîn ew yekkirina ji alî Tirkan ve pêkhat. Yanê li ser hestiyên pişta Kurdan wan dewleta xwe damezirand.

Ji komên ji Xorasanê hatinibûn yek jî ji alîTirk û Ereban ve wekZulqadir, yan jî Dulqadir tê binav kirin. Le di bingeh de navê wan ê rastî ne ew e. Mirov dikare texmînek bike, bibêjê ku ew nava ji serokê wran Qadir hatiye; di kurdî de "dul" di wata zarok û tov de ye ku tê mana zarokên Qadir. Navê xwe yê kevn çi bû? Bersiva vê pirsê ne hêsan e, lewra hemû belge di destê serdestên me de ne û li gorî dilê xwe şirove dikin û bi gelé didin qebûl kirin. Prof. Y. Yucel jî dîtinê me piştrast dike: Di dîroka Osmaniyan de Zulqadir, di jêderên Misir û Sûriyê de jî Dulqadir derbas dibe û wek kok jî Xorasan derbas dibe. Ji berê ve li aliye Mereş û Elbîstanê rûdiniştin. Bi dewleta Memlûk re girêdayî berbi Meletî, Xarpût ê fireh bûn. Hukumdarê xwe yê yekemîn Zeyneddîn Qaraca ye. Serokê êlê, ji bo qehremaniya wî siltanê Memlûkan Melik Naşir e w wek serokê hükümete naskir. Li dijî Ermenivan serkeftî bû. Li nivîsa li ser keleha Zamantî "Emîr Xelîl bîn el merhûm Emîr Zeynûddîn el Zulqadir Xorasanî" hatiye nivîsandin.(35) Ew belge jî vekirî dide xuyakirin ku ew ji Xorasanê ne.

Ji dîroknûsê Tirk R. İnanç wiha dinivîse: Ji Anadol û Iraqê gelek Tirkmen hatin û xwe avêtin paş Memlûkan û hêza wan zêde kirin. Di dema Baybarsê Memlûkî de (1260-1277), Îbnî Şeddad radigihîne; ku tenê ji Anadolê 40 hezar xanên Tirkmen li navbera Antakya, Filîstîn û Gazze de bi cîh bûn. Bi yarmetiya wan, Baybars di sala 1266 an de erîşî Ermeniyan kir û Derbisak, Merzîban, Raban û Hadîd stend û kraltiya Antakya ya Haçli jî ji holê rakir.(146~4) Wekî di beşa Şadiyan de jî me nivîsî: nivîskarekî Ereb digot hejmara wan milyoneke. Ew 40 hezar xanên tê gotin jî bi qasî ji 5an lê Şadiyan dike, ku raste. Lewrra di hemû jêderan de hejmara Kurdên ji navenda Xorasan hatine gelek zêde xuya dike. Yekê jî, pêwîste lêkolînerên Kurd berhemên ew nivîskarên Şadî derxin holê. Dibe ewr ji bo dîroka Kurd bibe xelekeka girîng. Memlûkan ji bo ku sînorên xwe yên bakûr bikin bin ewlekariyê, Tirkmenên ku ji ber Moxolan

reviyabûn li bakûrê Suriye bi cıh kirin. Di sala 1298 an de, Mereşa di bin deste Ermeniyan de wergirtin; ji wê dîrokê bi şûnde Mereş ji alî beğen Tirkmen waliyên Memlûkan ve hate birêvebirin. Ji Helebê heta Mereşe kete bin desten ew Tirkmenên girêdayî Bozok û şaxû Bozok. Eğer mir ov bêje ku hîmê vê mîrîtiya hane di vê salé (1298) de hate avêtin di cîh de ye. Ku ew jî bi piştgiriya Memlûkan dibe û ji bo berjewendiya wan jî baş bû.

Farûk Sumer dibêje: Di sedsala XIIT an de gelek Tirkmen dijîn û gelek ji wan diçûn zozanên Uzûn Yaylayê; ji wan re Şamlû, Şam Tirklerî û Şam Tirkmenî dihate gotin. Ew Tirkmenena, rêxistina Oxûzan ya kevne mîna Boz- Ok û Uç-Ok diparastin. Gelek dem derbas bû, gelek cîh guhartin pêk hatin, lê eceb bû ku hîna jî ew sîsteman berdewam dikirin. Boz-Ok bi piranî li dora Helebê û Amîkê dijîn. Boz-Ok hîn zêde bûn û di nava wan de ew zend hebûn: Bayat, Avşar, Bex-Dilî, Doxer in. Ji wana Dulqadirên navdar derke tin.(13 Şam û Şamlû, wekî berê jî min gotibû êlên girêdayî Reşiya ne û bi taybetî jî ew wek Sêvikan tên nasîn. Wekî nivîskar jî radigihîne ew heta van deh salên dawî jî ew sîstema xirav nekiribûn û girêdayî kevneşopiyen xwe bûn. Ji wana yek jî Inallû ne, ku beşdarî Pezgewran bûne û êleka wan ê bi navê Şamlû jî çû Iranê. Hinek jî li dora Amasya, Samsûn û Çanqiriyê bi cîh bûn. Tirkmenên Samê di sala 1294 an de ketin Sêwasê û di sala 1337 an de li Elbîstanê Dulqadirî damezirandin.(l31IM) Uzûnçarşili jî hinek bi ferq vê yekê tîne ziman: Li Elbistan û Mereşê rûdiniştin; bi mêranî û şîdeta xwe têne nasîn û ji Bozokên girêdayî Oxûzan e. Di sala 1339 an de, di bin hakîmiyeta Memlûkan de mîrîtiya xwe damezirandin. Paşe ew heta Meletî û Xarpûtê fireh kirin. Serokê xwe yê yekemin Zeynûddîn Qaraca ye,(31169)

Prof. Yinanç, li ser êl û federasyonên ku Dulqadiriyan tînin meydanê jî agahiyên girîng dide: Elên ku gelé Dulqadir pêktînin ev in: Bayat, Avşar û

Beydilî ne.(146'7) Di beşa Qeremaniyan de jî me nivîsî bû, ku Bayat şaxekî Tabanliyên wek Bozûlûs têne nîşandin. Ku îhtîmaleka mezine ew Têrikiyê îro ne. Avşar jî konfederasyoneka êla ye, ku Celikiyên îro şaxekî wan in. Beydilî jî gor ez difikirim Canbeg yan jî şaxekî Reşiyan in. Ew êl û federasyonên élan yen ku navê xwe derbas dibin, hemû li Anadola Navîn hene. Mirov dikare parçên wan li herderekê bibîne û gelek jî bi navên cûda dijîn. E. Kiran jî dibêje: Rêxistina Dulqadiriyan wek organîzasyonekî Milan û Tirkmenan xuya dike; serokê xwe Qaraca Beg e û îhtîmaleka mezine ku navê çiyayê Qerecedax ji wî tê (m m) Lj aiiyê din, milekî van êl û komana jî tim di nava rêxistin û hêzên Iranê de ne. Wek nivîskar diyar dike, ji artê§a Hamza Mîrza yê Sefawî, Alî Xan (ji êla Şadiyan girêdayî Dulqadir e) bû begebeganê Fars.(U2"14,) Li wir jî xuya dike; ku yek ji yen êlên Dulqadirî avakirine jî Şadî ne. Ela bi navê Şamlû jî giiêdayê vê mîrîtiyê xuyadike. Doç. Taşdemîr dibêje: Di arşîva Osmanî ya giiêdayê serokwezîrtiyê de, deftereka bi 223 rûpelan heye ku temamê vê ji Kurdên Şame û berên girêdayî vê dinivîse. Elên li Anadolê û êlên Kurdên li Şam, Amîk, Rûmkalê, Meletî, Axzaz, Riha, Gerger, Kolik, Besnî, Semsûrê

têde ne. Navê vê: "Defteri Mûfasedsalaal-i Lîva-î Axzaz û Ekrad" e. Li sala 943/1536 an hatiye amadekirin.(109'8) Bê guman bi vî rengî gelek jêder hene lê em nikarin bi dest bixin,

Dulqadirî, bi piranî li rojhilatê çiyayên Amanosan zivistan derbas dikirin û havînan ji diçûn bakûr: Bînboxa, Berit, Nûrheq, Akçadax û Tohma. Li vê herêmê, dema Moxol jî berbi lewazbûne diçûn, beşek ji Tirkmenên Bozok û Axaçeri di bin serokatiya Zeyneddîn Qaraca de gihîştin hev. Gor Arifi Paşa, Qaraca, kurê Dulqadir Beg e ku di sala 1310 an de miriye. Gor dîtina Şikarı jî Dulqadir lawê xwe bi 40 hezar eskeran ve li dijî Qeremanan şandiye alîkariya Şelçûqiyan. Mehmet Begê Qereman Qonya zept dike û

kurê Dulqadir jî davêje zîndanê. Piştre, Eretna navbeynkariyê dike û ew azad dibe.(146'9) Ew jî mînakekê din ê ku Kurd çavva bi pişta hev ketine.

Li gor prof. Yucel dinivîsîne, Dulqadirî li dora (1335) Heleb û Dîlokê dijîn. Bi teşwîqa siltanê Memlûkî û bi daxwaza wan bi xwe ew erişî ser dewleta Eretna dikin. Ji bo ku Eretna xutbe li ser navê Memlûkiyan naxwîne, siltan Melîkûn-Nasir piştgiriya Qerecê Begê Dulqadir (Bozok) dike. Ji erîşân Dulqadiriyan şunde Darende dikeve destê Qerece, Dulqadirî berbi Mereş û Meletî ve belav dibin û siltan bi vê kefxweş dibe û emîrîtiya wî qebûl dike. Di sala 1338 an de Eretna eriş dike, lê dîsa têk diçê û Qerece Beg vê dewlete gelek caran li dor xwe diğerine. Ji vî şerî şûnde li ser 20 hezar hesp, mî û heştir li hev tên.(35) Sazbûna Dulqadiryan jî raste vê dernê (1335) tê. Di sala 1348 an de li dora Helebê, Qerece gelek cîh zept kirin û xwest hukumdariya xwe îlan bike, lê di şere li dijî Memlûkan de têk çû û hat daliqandin. Li ser vê jî Yucel dibêje: Di sala 1341/42 an de waliyê Helebê ji Siltan re dibêje Qerece û Eretna dixwazin erîşî Helebê bikin. Qerece xwe siparte Memedê Eretna, wî jî ji ber zora Memlûkan ew teslîm kir û di sala 1353 an de li Qehîrê hate kuştin.(35> Mintaşe Meletî jî ji Qadî îttîfaq xwest. Qadî li dijî Memlûkiyan hişk bû û got: Edî kolê Çerkezan di Anadolê re darbas nabin! Wê demê Çerkezên ku li Qefqasya dîl dihatin girtin bi riya Derya Reş dibirin Sêwasê û li bazaran wek esîr difirotin Misirê. Mintaş, ji tirsa Şam û Memlûkiyan dixwest Meletî teslîmî Qadî bike û ji aliyekî ve jî dixwest ew li dijî hev bi kar bine. Di dawiyê de birayê xwe ji Qadî re şand ku Meletî teslîm bike. Di vê demê de tişte balkâş ev e ku Mehmed Reşî yê Pezreşan jî bi Mintaş re di îttîfaqê de ye. Mehmet, dema Tîmûr di sala 1387 an de hat Kurdistan û Anadolê bi wî re şer kir, lê têk çû û reviya Meletî. Ti vir îttîfaqa Osmanî û Memlûkan balkâşe.

Gor dîtina Tori jî, Tîmûr ku Sêwas heyna şunde; Yoluk Osmanê Pezgewran jî heyna ba xwe û erîşî Dulqadiriyan kir; dixwest ceza bide wan. Dema

gihîşte Elbîstanê Dulqadiriyan dhen xwe terk kirin. Tîmûr, Darende û Elbistan xira kir û bere xwe da Meletî. Ev herêma çesiband.(38)

Di sala 1337 an de li Mereşû kesekî bi navê Tarakî (Tarakli) derket û xwe xwediyê Mereşû îlan kir. Bi kurê Qaraca Xelîl ve şer kir û xwe avêt paş waliyê Helebê. Di dawi de Siltan Naşir herdû jî anîn Qehîrê û nûnertiya li bakûr da

Qerece. Bi vî awayî di sala 1337 an de, mîrîtiya Dulqadiriyan ku dû sed sal bijî, li Mereş û Elbîstanê hate damezirandin. Piştre bi Eretna ve gelek şer kirin û Eretna têk bir û Darende wergirt. Lê serokê Beydiliyan Taşgun (Danûşgu) serokatiya Qerece nasnekir û li hember wî rabû û di her tirşende de erîşî êlên Dulqadir dikir. Danûşgu ji alî waliyê Helebê Altûnboga ve dihate destek kirin. Ji bo ku Taşgun ji holê rakin, bi serlêdana Qerece ya waliyê Şame zext li waliyê Helebê kir û Taşgun avêtin zîndanê. Lê paşê bi alîkariya êlên girêdayî wî, ew hate rizgarkirin û ji zîndanê reviya. Di sala 1341 an de Naşir mir û ji tirşende Qerece xwest îstîfade bike û serxwebûna xwe îlan bike. Di sala 1352 an de sil- tanê Misir bi hêrsket û mirîtî da destê Remezan Begê Uçok (Remezanoglû) an. Qerece li hember vê derket lê têk çû, jin û du kurên xwe û gelek ji û ajalên wan ketin destê Memlûkan û wan jî hemû firotin. Qerece jî xwe avêt bextê Eretne û wî jî di sala 1353 an de ji Memlûkan re şand û bi eşkence kuştin.(14h~10)

Paşe kutê Qerece yê bi navê Tîmûr li hember Memlûkan berxwe dabe jî, nikaribû bi serkeve û îtaat kir. Kuiê wî Xelîl Nasiruddin, Qereman û Remezanî têk birin, 1419. Paşê dijminê Memlûkan, Canbey Sofî girt lê teslîmî wan nekir. Ji ber vê bajarê Qeyserî ji dest hate girtin û dane Qeremaniyan. Canbey Canbegî ye. Ev serok di sala 1442 an de mir. Ûzûn Hesen ji wan Xarpût stend û dewleta Osmaniyan bi Memlûkan ve jî li ser Dulqadiriyan şer kirin.(29) Nasirûddîn Begê Dulqadir li hember

Memlûkan stû nerm bû û ji ber wê Qeyserî di destê wî de bû. Lê Canbeg Sofî li hember Barsbayê Memlûk bû û ji ber vê reviya Anadolê. Nasirûddîn ew girt û ji Barsbay bo wî pere xwestin. Dema wî pere nedan, Dulqadiriyan ew azad kirin. Ji vê fersendê Qeremaniyan îstîfade kir û serî li Memelûkan dan û xwestin Qeyseriyê bikirin. Dulqadiriyan jî ji Osmaniyan alîkarî xwestin.(3124)

Serokên Dulqadiriyan:

1. Qerece Beg ?- 11.12.1353

2. Xelîl Beg (1355-1386): Piştî Qerece, bi destûra Memlûkan, Xelîl Beg hate rêvebiriyê. Wî jî Mereş, Meletî, Xarpût, Besnî, Amîk heyna û welatê xwe fireh kir û du caran jî artûşa Memlûk belav kir. Lê cara sêyemîn Memlûkan di nav malbata Xelîl Beg de dubendî derxistin û beşek kişandin aliyê xwe.1146' 27) Di van salan de em dibînin ku Dulqadiryên birayê serok Xelîl, Osman dişînin alîkariya Qadî Bûrhaneddîn. Di şere li Kazabad (nêzîkî Amasya) de Qadî ji çembera dijmin rizgar kir. Ittîfaqa Xelîl û Qadî, Darende û Dîvrîxî ya girêdayî Memlûkan dan talan kirin. Bi ser vê de, Yelboxa li Darende û Sêwasê; Dulqadirên bi Tirkmenên li Harranê û Ras al-Ayn ê di îttîfaqê de têk birin.(3:,) Xelîl Beg ji alî birayê xwe Ibrâhîm ve bi suîkastê hate kuştin, sal 1386 bû. Sûlû derbasî şûna wî bû.|3M7ü) Serokê Memlûkan Berkûk, Xelîl da kuştin; bi ser vê de Qadî dijminatiya wî kir.

3. Sevlî Beg: Di serdema birayê xwe Xelîl de fermandarekî bi nav û deng bû. Wekî tê zanîn hîna jî êleka bi navê Sêvika heye û îhtîmaleke pir mezine ku

navê wî begî girtinê. Di sala 1379 an de Memlûk li Mereşe bi tûndî têk birin. Di sala 1381 an de arteşa Memlûkan; bi Ereb û Tirkmenén girêdayî Memlûkan ve tevhev li Mereşe hatin ber arteşa Dulqadiran. Sevlî Beg

vekişî çiyan. Dulqadirî derbasé erîşû bûn û serokê Hezebanî yê Kurd Şerefeddîn kuştin, lê dîsa jî nikaribûn Memlûkan têk bibin.(146 27) Ew jî rewşa Kurdan dide ber ça van. Du sêd sal berî vê demê kalê Sevlî bi yen Şerefeddîn ve li Arranê mil dabûn milên hev û dewlet çêkiribûn; îro jî hevdû dikuştin! Piştî şere du rojan Dulqadirî têkçûn û Sevlî Beg reviya û gihîşte Xarpûtê. Piştî vî şerç Remezaniyan jî Memlûkan lêborîn xwestin û giredana xwe bi wan re dan diyar kirin. Reîsê civateka Dulqadiriyan Heyderê Bişan jî giredana xwe bi Memlûkan re diyar kir. Li Xorasanê êleka bi navê Bîçerane heye ku wek şaxekî Sêvikan tên nasîn, ew nav nêzîkî hev in û dibe ku êlê navê xwe ji wî serokî girtibe. Di sala 1385 an de Sevlî Beg ji birayê xwe veqetî û çû Helebê cem walî Yelboga Nasirî. Nasirî yen ku îro li navenda Anadolê girêdayî Reşiyan jî divê ji navê wî hatibin. Siltan Berkuk xwest ku waliyê Helebê Sevlî ji wî re bişine, lê walî ew yeka nekir û di şûna vê de ew kire zîndanê. Ji siltan re neşandin îttîfaq û giredana Kurdan ya feodal derdixe hole; herçiqas bi siltan re girêdayî be jî, alî birayê xwe bi kesî nade û wî naşîne. Paşê rê da ne û ew reviya. Bû serok bi şûnde Memlûkan artûşek şand ser, ew li Goksunê têk birin û bi ser vê de, birayê wî yê li Qehîrê di zîndanê de li hember wî derxistin. Osman tevlî Sevlî bû, lê Ibrâhîm li hember wî derket û ti encam negirt. Memlûk neçar man ku bi Sevlî re têkevinnav têkiliyan. Birayê Sevlî Dawid, di sala 1388 an de çû Qehîrê û li wir berpirsiyartiya emîratiya Onlar (Emîrû'l-aşare) hate dayîn.(146‘29) Biraziyê Sevlî Nasreddîn Muhammed di sala 1388 an de apê xwe û hêzên Mintaş bi tûndî têk birin. Sevlî reviya û çû cem Qeremaniyan. Di sala 1398 an de bi fermana Memlûkan Sevlî û jina wî di civan de kuştin.(146'33) Sevlî ji alî Ereban ve bi navê Heykelût-Tirkmen û bi wêrekiya xwe dihate nasîn.

4. Sadaka Beg: kurê Sevlî derbasî serê mîrîtiyê bû, lê Yildirim Beyazidê Osmanî ew ji bajêr derxist û şûna wî Nasreddîn Mehmet di sala 1399 an

de anî ser text. Di sala 1419 an de di navbeyna Qereman û Dulqadiriyan de dijminayetî destpêkir û Mehmet Begê Qereman dîl kete destê Dulqadiriyan.(,46'45) Di sala 1442 an de Nasreddîn mir û kurê wî Silêman derbasî cîhê wî bû.

5. Silêman: Keça xwe Sitî da kurê Mûratê II an Fatîh. Keçeke xwe jî cia Siltanê Memlûk Melîk Zahîr Çakmak û têkilî xûrt kirini31172)

6. Melîk Arslan: Piştî bavé xwe Silêman derbasî cîhê wî bû. Wê deme Hesenê Dirêj di lûtkeya bi nav û dengê navê xwe de bû, Ji Dulqadiriyan jî, Qere Beg û Abdî Begê ji Bayatan û Huseyn Begê li Qerecedaxa-Amedê rûdinên jî di sala 1457 an de di emrê Hesen de bûn.(H6‘59)

7. Şah Bûdak: Piştî birayê xwe derbasî serokatiya mîrîtiyê bû. Lê li destpêke xelk li dij derdiket û ew bi kuştina bira)« wî tewanbar dikirim Hin kes serî li Fatîh dan û xwestin ku Şah Siwarê birayê Şah Bûdak bê ser text. Fatîh jî walîtiya Bozok (Yozgat) û Artûk-abad (Artova) dabû Şah Siwar. Bi ser

vê de, Bozokî û Dulqadiriyên belav bûbûn re jî ferman şand ku têkevin bin fermandariya Şah Siwar. Ji wê belge tê fêhmkirin ku hin Dulqadirî, yan ji ber began yan jî ji ber hin sebebên din barkiriye Tokat û Yozgatê. Di sala 1466 an de Şah Siwar li Zamantiyê birayê xwe têk bir. Di sala 1468 an de Memlûk jî tek birin û erîşî Remezaniyên nêzîkî Helebê kir û ew şerpeze kirin û bajarên wan girtin. Ji alî din ve, ji malbata Bozok Sevîndîk û Sûsa, ji Inalan Ibrâhîm, Pezgewran Ebû Tahîr û bege Egilê Şah Elî Hesenê Dirêj terk kiribûn û hatibûn cem Dulqadiriyan. (146'é7) Şah Siwar û xismên wî û serokên Tirkmenan hatin girtin û Memlûkan ew birin Qehîrê. Xismên wî hemû tazî li heştiran siwar kiribûn û paşe bi şûran hemû kirin du felq.(I4b‘76) Piştî vê Şah Bûdak dîsan hate ser text. Ji ber wê yekê, bira, mam û gelek begên êlên Dulqadiriyan ji ber şerm û wahşeta li Şah Siwar

hate kirin xeyîdîn û çûn Amasya cem Şehzade Beyazîd. Birayê Şah Siwar Alûddevle(leqebeka xwe jî Gavsûl-Mille ye) keça xwe da Beyazîd.(146‘77)

8. Elî Beg: Di şere bi Şah Ismaîl re ew li kêleka Yawûz bû; li şere Merddabik de li kêleka Zeynel Paşa bû; di wergirtina Misir û Şanre de ew li pûş bû; di serhildana Celaliyan de roleka pir mezin lîst û sere Celal ji padîşah re şand; Canberdiyên li Şame serî hildayî têk bir. Ferhat Paşa ew û zarokên wî dawet kirin û got emê herin ser Şah. Lê wî, Elî Beg û zarokên wî hemû kuştin û sal 1522 bû ku dawiya Dulqadiriyan jî hat.l44MD5) Bi vê taqtîgê Osmaniyan gelek fermandar û serokên Kurdan yen jêhatî kuştin. Li destpêkê ew bikar dianîn û piştre jî ew dikuştin, ku bila ji wan re nebe xetera pêşerojê.

Di vê serdemê de Kurdên li rojavayê Anadolê ketin nava gelek tengasiyan. Evvên ku girêdayî mîrîtiyan bûn, dewletên wan hatin hilweşandin bi şûnde bi piranî çûn rojhilat, Arran, Tranê û hinek jî ketin bin sîwana mîrîtiyên hê heyî. Elên Kurd zanin ku êdî li vê xakê ji wan re jiyan dijwartir dibe û derfeta ku ola xwe bidin meşandine namîne. Ji bo vê li çara serê xwe geriyan. Li başûre Anadolê Dulqadiriyan, di navbera Osmanî û Memlûkiyan de polîtîka dostaniyê dimeşandin û ji valahiya nav herdû dewletan îstîfade dikirin. Li rojavayê Anadolê, Tirkmenên (Kurd) şîiyen ku tengavbûbûn berbi rojhilat çûn û li Iranê hejmara wan zêde bû. Avşar û Bayat jî tevlî Pezgewran bûbûn. Serokê Pezgewran Ristem, li şopa Şah Ismaîl digeriya ku wî ji holê rakê. Lê xaltiya Îsmaîl ew li Erdebîlê teslîmê jineka cerah/Dr. ji Dulqadiriyanê bi navê Aba- Ebe kiribû. Ji berê ve di navbera Gîlan- Erdebîl- Derya Kesk û Dulqadiriyên li başûre Anadolê de têkilî qût nebûbûn. jinikê jî Ismaîl teslîmê mirîdên wî kiribû. Ristem jinik li Tebrîzê lidarxist.(146~89)

R. Yinanç niqteyeka din ê girîng tîne ziman û dibêje: Di sala 1504 an de li Egilê emîr Lala Qasim Şah Muhammed ê Merdasî, Atak ê emîr Ahmed Mîr

Muhammedê Zerikî, Li Farqînê emîr Mîr Diyadîn Mîr Ibrahîmê Silêmanî hebû. Ew hemû, bixwe tevlî Dulqadiriyan bûn.(14é'9î) Mirdêsî, Zerikî û Silêmanî (gereg kalên Sewêdiya bin) tevlî Dulqadiriyan bûne ku ew êlên navê xwe derbas dibin, ji Qonya yê bigre heta Izmîrê û ji Enqerê bigre heta Bûrsê belav

bûne. Ve yekê Dr. Tûfan Gunduz wiha tîne ziman:

Li Anadolê herî zêde Dulqadiriyan êl belav kirin. Ji Mereşe heta Amed, Heleb, Bozok, Adana, Kütahya û Aydinê êlen xwe belav bûn. Şaxekî ji wê rêxistina girîng li Edenê bi navê "îfraz-i Zulqadiriyê" dijîn û li herêmên din jî beşekî girîng dijîn.(U5‘41) Li başûre Sêwasê; yanê li Dîvrîxî, Şarkişla, Kangal û Gurunê Tirkmenên Yenî II hebûn; ew ji êlên Dulqadir û Tirkmenên Helebê pêk dihatin. Ji bo ku reaya (karker) mizgefta Nûrbanû Siltanê li Uskudarê bûn, ji wan re "Tirkmenên Uskudar" dihate gotin.(115 41) Gundiyên Beşqavaxe yê girêdayî Cihanbeyliyê jî ew yeka dianîn ziman û bi taybet jî ji bo êla bi navê Sewêdî ew tê gotin.

Tbnî Verdî dibêje: Dulqadirî Tirkmen in, emareteka li Mereşe bi Memlûkan re girêdayî bû; di sala 1521 an de Osmaniyan dawî li vê mîrnîşînb anîn.(l9 94)M. Sûcû jî dibêje; Yawûz di sala 1515 an de dawî li mîrîtiya Dulqadir

Jineke li Erdebîlê -Gîlan

îro em ji defterên Osmanî fêm dikin ku Kurdên ji êla Hewêdî yên ku heta Xorasan û Hindîstanê belav bûne di sala 1524 an de li navça Keysûn a girêdayî Besniyê nişteciîh bûne. Keysûn, 1519 an de wek gundekî hatiye qeydkirin. Lê paşe 28 gund û 45 mezra pêve hatine girêdan. Gundên Dulqadirî ev in: Tokar, Havzane, Kami Açik. Gundê Hewêdiyan jî: Tîzlû,

Uzûn Kûyû, Cence, Tatarlû ne. Hejmara nûfûsê li van deran di sala 1524 an de nîvî nîvî dikeve...(UW'41) Tespîteka bi vî awayî jî nîşan dide, ku ew Kurdên mîrnîşîn avakiribûn, xwedî hêz û kudret in heta Xorasanê û Hindîstanê; li rojava jî heta Bûrsa, Izmir, Qonya û Enqerê belav bûne. Di §êxsiyeta mîrnîşîna Dulqadir de, trajediya Kurdên li dervayê welat jî rad ixe ber ça van...

GERMIYAN

(1299-1429) (Avşar, Mirdêsî...)

Ew nava ji ku û çawa girtibûn? Zêde nayê zanîn, lê di kurdî de wata germiyan: cîhê germî ku êlên Kurd lê zivistan derbas dikirin e. Avcioglû jî wiha şirove dike: Germiyan (Kişlak, li gorî hinan jî navê vê eşîrete Kermiyan (Qermiyan) qer=morê vekirî, miyan jî, mî ne. Bi Osmaniyan re şer kirin û xwe dan kêleka Tîmûr.... Cahen dibêje ew Tirkmen-Kurd in. Pêncî sal şunde Ibn Batûta dibêje, "Tirkmen bi çavêkî baş li Germiyanan mêze nakin û li gorî Tirkmenan ew 'Ezdî ne'.(24> Li ser navê wan em nikarin zêde tiştekî bêjin li gor van jêderan eger Kermiyan bin jî dibe ku were wata 'Kerî- miyan' yanê kesên xwediyê keriyên miyan in. Di alî Kurd bûyîna wan de ti gumanên mê nînin û ji sedî sed ew di riya Zerdeştî de bûn.

Gor texmînanji federasyon élan yan jî konfederasyonekê ji navenda Xorasanê hatiye. Hatina wan ê Kurdistan û Anadolê rastî berî ârîşân Tirkan dike. Her çiqas li ser hatina Tirkan yê Xorasanê konsesuseka tam tunebe jî, eger em bêjin piştî salên 1040 an, ê bi kêm şaşitî be. Pişte vê tarîxê Kurdên li vê herêmê hatin valahiya di navbera Bîzans û Kurdên li Kurdistanê de bi cîh bûn. Wekî berê jî min gotibû ew li hesabê Bîzans jî dihat. K. Kara, her çiqas bi armanceka din binivîse jî, dîroka ew dide em rast dibinîn: Begekî Selçûqiyan yê bi navê Çûbûk, di dema Melîkşah de tevlî servegirtina Anadole bû. Di sala 1085 an de îdara Xarpûtê dan

Çûbûk. Çûbûk beşdarî sefera Fatimiyan bû û piştre jî çû Edenê û Yemenê. Idara Xarpûtê jî da kurê

xwe Mehmet Beg. Pişti mirina wî serokî, begên giredayı Çubuk çun roiava

û ti Germivan bi cîh bûn; di sala 1213 an de dawî lê hat.'148'241) Germiyan, li

Kurdistan, li Meletiye ji der u doren Pütürge u Şıro re te gotin. Ew nava ji bo

Mereşe jî te bıkar anîn. Wekî tê zanîn ew piştî wir jî diçin dora Kütahya.

m o

Hinek dîrokzan dibêjin Mirdêsî jî Germiyan in û teori hene ku navê Mirdêsî ji Merdaiyan derketiye, milekî ji Şemsiyan e ku cîhê wan ji Hema heta Şebîn Qerehîsarê û bineciyên kevn yen Meletî û Dersime bûne. Hetanî dema Osmaniyan jî ew li dora Hema, Humus, Heleb, Ezaziye (Elezîz), Kilîs, Riha, Dîlok, Şimşat, Meletî, Xarpût, Dêrsîmê jiyane. Germiyaniyên ku çûnbûn Küta¬hya jî ji wan bûn. Dîrokzanê Yûnanî Stepan Asolîk ê di sala 1021 an de jiyayî radigîhîne: ku ji Dêrsîmê heya çiyayên Amanos êla bi navê Şemsiyan dijîn û ew ji rojê re perestî dikirin. Kurdên Ezdî ne û hê di dema Emewî û Ebbasiyan de li wir jiyane. Ji wan Kurdan êlên bi navê Mirdêsî, Dasinî, Yesyaniye, Besnaniye, Mûsan, Şerqiyan, Germiyan û yên din hene. Eğer di dema Emewî û Ebbasiyan de li wan deran jiyane mümküne ew ên ku Harun Reşîd anîne bin.

Li ser hatin û bicîh bûna Germiyanan agahiyên berbi çav kêm in; Mümküne ku dema ji Xorasan yan jî Arran batin ew demeke li çiyan û cîhên ji çavan dür jiya bin. Lewra heta sala 1299 an di derbarê wan de agahî kêm in. Lê tê gotin; ku Emir Avşîn di sala 1068 an de Amorîûm-Emîrdax-Afyon heyna û xirab kir, Tirkmenan navenda Anadolê bi dest xistin û şûnde vekişîn. Sala 1070 dîsa Tirkmenan di bin serokatiya Afşîn

de eriş kirin/191'31* Emîr Avşîn di vir de roleka girîng dilîze, gelo ew Kurd bû? Navê Avşaran ji wî tê an na? Ne dûr e ku ew Kürdana di dema wî de jî hatibin herêmê. Hayrûllah Efendî, di "îbn Bîbî Selçûqnamê" de dibêje: Weledî (-zarok) Alîşîr Germiyanî yê girêdayê Avşare ji zen da Oxûzan e/31'39* Em nizanin ku ew Alîşîr bi Afşîn ve yek şexs in an na, Elîşerek jî wek serokê êlê yê yekemin tê dîtin. Li wir tê destnîşan kirin ku Germiyan ji Avşaran e. Dibe ku wê demê Meletî li destpêkê weke baregeh bi kar anîbin û ji wir êrî§î rojava kiribin. Ebûl Farac dinivîse ku; ew êl an jî kom ji kevin ve li dora Meletî û Semsûrê dijîn. Iskenderê Makedonî mir şûnde Seleûcûs Antaqya, Urhaî û Germanikî (Mereş) ava kir/48* Ew dîroka jî mirov dibe berî zayînê û divê tekîliya vî navî bi wan êlana re jî hebe. Prof. Uzûnçarşili dibêje: Germiyan cara yekemîn, di destpêka sedsala XIII an de, em li dora Meletî dibînin. ihtimale ku bi Celalûddîn e Harezm re di sala 1299 an de hatibin/31'39* Vê dîtinê E, Farac û gelek jêderên din pûç dikin, lewra ew dibêje ji mêj ve ew li wir in. Gor kevirê ji tekê ya Qerebaba hatî muza Afyonê, Tirkmenên li (Afyon) wir di sala 1156 an de bi cîh bûne/191'15* Ew kevirên li goristanên Afyonê derketine îspatek baş in ku Germiyan di sala 1156 an de hatine wir. Li Meletî çiqas man em nizanin, lê ew teqrîbên derdikeve holê, ku herî kêm 70 sal e. Dîtinek jî dibêje: Germiyan di sala 1240 an de li Meletiyê bûn/1?1'182* Ew zêde rast nayê, lewra kevir ispata herî mezine ku ew di sala 1156 an de li Afyonê bi cîh bûne, yan jî gorê xwe hene. Lê, li ser vê ditinê mirov dikare bibêje ku gelo ew li Meletî parçe bûn? Eger îddea 1240 li Meletî bûn rast be, Germiyanê li Meletî parçe bûne. Kevirên mîna yên li Afyonê, li Meletî di goristana Kirklardejî hene/191'28* Ewjîîspateku ew ji wir hatine. Yanê li Meletî man û hunerên xwe derbasî ser keviran kirin; ji ber sedemekê ew - Moxol ?- çûn dora Afyonê. Di sala 1299 an de tê dîtin ku Germiyanî li Kütahya dijîn/131

1SZ| Bi ser hatina Moxolan de Germiyanî ji Meletî jî berbi rojava çûn.(lls"27)

Kazim Yeşîlgoz îddea dike ku serokên hikumeta Germiyanî li dora Semsûrê dijiyane. Dema Kurd ji van deran berbi rojava çûne, li destpêkê li dora Enqerê û paşe jî çûne li Kütahya bi cîh bûne.(39) Gava hatine Enqerê serokatiya vêderê demeke kirine destên xwe. Li Enqerê li ser navê serokê vê êlê Yaqûb (1299) mînberek ha tiye neqişkirin û ji xwe re Yaqûbê kurê Elî Şer gotiye. Ev minber li muza Etnografya Enqerêye.(24) Di pirtûka Yoncali Hemamî ya ji sala 1234 an de mayî tê fêhm kirin; ku pişti sala 1241 an ew bicîh bûne. Yanî berî sala 1276 an em wan li Denîzlî û Kütahyayê dibînîn.(3M0) Alakom nikteyeka balkê§ radigihîne: Di defterên Tahrîr yen sala 1463 an de xuya dike ku li Yabanabad a girêdayî Kizilcahamam-Enqere gundekî bi navê Kurtler/Kozkoy- Kurdan heye.(126'32) Di defterê de ji bo wî gundî wiha tê qalkirin: Nişteclhön Kurtler, Kurd in. Di sala 1463 an de hejmara wan 35 xane ne, di sala 1572 an de ew gihîştiye 65 xaneyan.(126"34) Di vir de lêkolînerên Kurd dikevin şaşîtiye: Di lîsta gundan yen ku dane de piranî navên tirkî ne, tenê navê Kurtler bala lêkolînerên me dikşîne ku kêmasî ye. Lewra di heman lîstê de navê gundên Milan, Kosan, Merdsalarû (Mirdês-salarû) jî heye ku navên kurdî ne û liste bi temamî gundên Kurdan e, lê navên tirkî 1İ wan danîne. Bêwîste ev bê zanîn û tenê ketina du navên kurdî jî me dibe şaşitiyan. ..Wekî min dabû xuyakirin, cîhbûna Kurdan ya li rojavayê Anadolê heta salên 1068 an diçe. Ji sala 1156 an wir ve belge hene; lê berî wê demê jî nişteclhbûn heye.

Li Pütürge û Şîro êlên bi navê Germiyan û Kurdan rudiniştin.(39) Ji vê îddeayê jî derdikeve holê ku Germiyan ne tenê êlek e. Li wir du şax in, lê bi dîtina min ew herî kêm du federasyonên élan in. Di sala 1200 an de Germiyan serokatiya komê dikir. Gor îddeayên nûserên Tirk: di dema

serhildana Bav Isheq de, Elî Şâr ji wan her du élan lê§ker kom kirin. Di navbera salên 1237¬1246 an de Selçûqiyan ew serokan li dijî Bav Isheq bi kar anîne, lê di dawiyê de Selçûqiyan ji Elî Şûr re gotiye "te li me îxanet kir!" û ji bo vê eskerên me têk çûn. Ji bo wê tewambariyê mirov dikare du alternatîfan derxe pê§; yek, ew bi lîstikên (xapînokên) Selçûqiyan li dijî birayên xwe derket lê di bin re jî hevkarî bi alîgirên Bav Isheq re dikir. Yan jî Selçûqiyan karê xwe pê temam kirin bi şûnde, wek hemû caran îxanekarên miletê xwe bi tewanbariyekê jî holê raki- rin...Bi dîtina dîrokzanê Rûs Gordlevskî, Keyhûsrevê 11 an ji bo raperîna Bav Isheq ya di sala 1239 an de derketî, ji Germiyanên li alî Meletî alîkarî xwestiyê. Ji bo vê li rojavayê Anadolê bi cîh kirin.(24)

Ji Elî Şêr bi şunde Muzeffereddîn dibe serok û di navbera wî û Selçûqiyan de nakokî derdikevin. Kes nanivîse ku ka ew nakokî çi bûn? Bi dîtina min ew li ser tekoşîna li hember Moxolan bûn. Selçûqiyan nedixwestin li hember wan bisekinin û Germiyanan jî dixwest biîttîfaq li dijî wan şer bikin. Ji ber Selçûqiyan xwe nedan ber vê, wî bi êla xwe ve cîhê xwe ji êlên, yan jî Kurdên mîna: Badilî, Kurdan û Ezîdiyan re cî hiştiye. Gor Yeşîlgoz jî, di serhildana Bav Isheq de bi Kurdên Kolik-Keferduzê re ketin tevgerê. Ji bo vê mîrîtiya Germiyan ê ji

Kurden Sadie pêk tê, Selçûqiyan ew ajotin, 1241, Kütahya.(39) Bi vê re girêdayî zahmete ku mirov bêje Selçîqiyan ew ajotin Kutahyayê. Wan ji ber Moxolan cîh guhartin û çûn herêmên hîn zêde ewle. Li dervayê vê serhildanê mayîn jî zêde ne balkeşe û berovajî wê ew jî ji beşekî serhilderan bû. Niqta din ê girîng jî girêdana wan Sadica ye. Wek tê zanîn Sadie bi Sakan ve yek in û Sadie li Arranê bûn ku ji wan re bi navê gîştî Şadî jî tê gotin. Vê ditinê hema hema Yeşîlgoz jî dipejirîne: Mîrîtiya Germiyan li bajarê Meletî, Puturge, Akçadax û ava Tohma ji alî Kürden ku ji Anî û Gênce hatibûn ve hate damezirandin. Dewleta Selçûqî, ev

Kürdana ajot Kütahya. Navê êla wan Kurdan Sadie (Sad'lû) bû. Bi taybetî li Arapgîrê û Akçadax cîhê ku koma Etmaniyan îro lê rudinên, bi 10 hezar konan hatin û lê weder bi cîh bûn.f3‘!) Bi dîtina ismet Chérît Vanli jî, çûyina wan ê Kutahyayê nayê zanîn, lê li gor texmînan sala 1241 an e. Di sala 1276 an de ew li dora Denizliye xuya dikin.(29) Prof. Cahen jî dibêje: Germiyanî di sedsala XII an de ji Meletiyê derbasî rojavayê Tirkiyê hatin kirin. Xelkekî ji Tirk û Kurdan pêk dihatî bû; paşe Kurd asîmîle bûn û bûne Tirk. Bi taybetî jî Kurdên ku ji Anadolê çûbûn Ezerbeycanê di nav Tirkmenên wir de bûn Tirk.(24) Ew dîtina ku Tirk jî di navê de bûne, bi min rast nayê, lê piştre, bi xisimatî, mumkune ku Tirk jî tevlî wana bûne. Dema mirov li beşek ji gelé Ezerbeycanê yê îro mêzedike, mirov dibêje beşek ji wê ditinê raste; lewra hinek ji vî xelkî wek kopya Kurdan e lê bi tirkî diaxivin. Yekî jî gelek jêder radigihînin ku bi sed hezaran Qereçoriyên vê heiêmê asîmîle bûne (heliyane).

Ditina me tevlîbûna Tirkan ya nava Germiyanî Prof. Uzûncarşili jî piştı ast dike: Di sala 1288 an de Mûradê Germiyanî li hember Selçûqî û Mox¬olan şer dike, lê şehîd dikeve. Ew şera dîtinên me li jor gotî Germiyaniyan dixwest bi îtîfaqa Selçûqiyan li hember Moxolan derkevin dipejirîne. Ji bo ku Selçûqiyan xwe dan alî Moxolan wana jî li hember herdûyan tekoşîn dan. Heta sala 1289 an tekoşîna Germiyan ji bo Denîzlî, li hember Tirk û Moxolan berde- wam dike; serokê Germiyan Husamûddîn Alîşer e û di dawî de Tirk bi serdi- kevin.<31'40) Moxolên ku dewletên mezin li ber nesekinîne, Germiyan li hember derketin û bi wan û Selçûqiyan re şer kirine ku ew jî qudret û hêza Germiya¬niyan derdixe holê. Ji wî şerî jî tê fêhm kirin, ku ne maqûle Osmaniyan ew hêza hanê bi zorê şandibin Kütahya yê. Ew dîtina min ji alî jêderên din ve jî tê pejirandin:

Osmanî dema ketin rewşa firehbûne, Germiyan gelek bi hêz bûn. Lê Osmaniyan li destpêkê bi rola gelé Germiyan biparêzin û bi rola ji mafên

mi- rovên wan adil bin derketin holê û li dijî Germiyaniyan kar kirin. Piştre, di tekoşîna navbeyna beyliga cîran a bi navê Karesîogûllari de cîhe xwe li ba Karesîogûlari girtin û bi gelek şâweyen cûr bi cûr ew kirin bin desthilatdariya xwe. Xaka Germiyan jî hinek bi xisimatî; ya Hamîdogûllari jî bi pere kirin. Dema Osmaniyan xaka mîrîtiyên Anadoliyê kir bin destên xwe, li riya meşru pir bi dîqat bûn. Ji bo wê huquqa îslamî derxistin pês, Bi navê cîhad (manî-î ga¬zaya gaza, gaza-yî ekber) gelek cîh girtin û hêzên ku li dijî wan derket jî wekî

"rêbir" îlan dikirin.(82) Taqtîkên Osmaniyan yen wê demê bi kar dianın gelek balkâş bûn û heta roja îro jî ew berdewam dikin.

Eger ne ew lîstik û taqtîkana bûna, ew dewleta ku gelek cîh di dest de Ci bi hêz bû têk nediçû. Li rojavayê Andolê wekî nivîsîna "Camîû'd Duvel" jî radigihîne: Germiyaniyan, ji bilî navenda Kütahya, Uşak, Gedîz, Armûtlû, Gokoyuk, Selendi, Kula, Tavşanli, Banaz, Işikli, Baklan, Tonuzlu, Honaz, Dazkiri, Geyikler, Eşme, Homa, Sîmav, Emed û gelek navçên din hükümdarı dikir in.*31-41 * Hema hem a rojavayê Ana dole di bin desthilatd ariya wan de bû.

Bi dîtina ismet Cherîf Vanli, Germiyanî di sala 1276 an de ii Denizlî û derdora wir xuya dikin. Wezirê Selçûqî Sahîp Ata, çiqas xwestiye Denizliye dagir bike jî, nikaribûye. Di heman demê de Germiyanan bi îttîfaqa Selçûqî- Moxolan re jî şer kir û vê yekê heta sala 1289 an berdewam kir. Di sala 1299 an de firehiya welatê xwe heta Kirşehîre dirêj bû.(29) Li ser vê yekê nûserên Tirk dibêjin ew di bin fermandariya Selçûqiyan de pêk anîne:

Yek ji wan jî Uzûnçarşiliye ku dibêje: Yakûb dema di bin fermandariya Selçûqiyan de bû heta Kirşehîre hükme wrî derbas dibîi û ji wêderê re Yakûbelî dihate gotin.(3,'41) Ew gotina Yakûbelî, zêdetir ji bo sînorên du welatan bikar tê. Di sala 1303 an de bac dan Ilhaniyan û desthilatdariya

wran naskirin. Ji ber wê ji bin destên Selçûqiyan derket. Bi vî awayî li Kütahya mîrîtî avakir û ji Qeremaniyan bi şûnde li Anadolê mîrîtiya herî bi hêz e. Ş. Omerî dinivîse ku Bîzansan her sal 100 hezar zêr û diyarî didan Germiyan. Bi mîrîtiyên girêdayî vê 200 hezar eskerên wan hebûn.(31'41) Bi wreqas esker û bac dayîna Bîzansan hêza Germiyan eşkere xuya dike; ne mumkune ku hêzek wiha bê daxwaza xwe têkeve bin destên Selçûqiyan yan jî hêzek din. Lê xelk ew bi riyên din kirine bin destên xwe, yek ji wana jî xisimatiya bi Osmaniyan re û bi riva ol e.

Şah Silêman (S. Çelebî) di sala 1363 an de bû begê Germiyan. Ji bo ku ji bakûr ârîşûn Osmaniyan, ji başûr ve jî yen Qeremaniyan rawestîne keça xwe ya ji jina wî ya keça Mewlana Celadettin Rûmî da Yildirim Beyazît û ji bo çihêzê wê keçikê jî Kütahya, Tavşanli, Simav, Emed dan Osmaniyan û bi xwe jî vekişî Kûla, 1378. Li cîhe wî Yakûb rûnişt. Wî jî Kütahya û cîhên din ji destê Osmaniyan girtin; lê Beyazît di sala 1390 an de w'elatê Germiyan bi temamî heyna.(31‘45)

Prof. Yucel jî dibêje: Li dijî Osmaniyan, mîrnîşînen mîna Qereman, Sarûhan, Germiyan, Menteşe û Hamid-ili Beg ketin ittifaqê. Ji ber sedema, ku Beyazît birayê xwe Yakûb dabû kuştin; vê îttîfaqê erîşî Osmaniyan kir. Germiyanên, ku berê ji bo cihêza xwişka xwe Kütahya dabûn Osmaniyan bi ser vê bûyerê Kütahya dîsa stendin. Osmaniyan jî bi Sirban re îttîfaq kirin, ji Candaroglûyan (me gotibû Lek-Şâxbizin in) jî alîkarî stendin û ji dest Germiyanan Aydin, Menteşe û Alaşehir girtin, sal 1388 bû.(35) Di sala 1427 an de welat dîsa dikeve bin destê Osmaniyan. Di vî warî da Ibnî Betûta dibêje: Dema ez çûme welatê Germiyan ez rastî Êzdiyan hatim. Di sala 1603 an de ji welat hatine derxistin û li Axske, Axeskelek, Eçmiyazc û Qersê binecî bûne...Gorî

Betûta ti têkiliyên wan bi xerîban re tunebûne. Ew jî îspate ku heta wê demê hîna jî ew Kürdana dev ji ola xwe bernedane. Lê li hember erişen

Osmaniyan ên bê wijdan dûmahiyên Germiyanan zêde nikarin li ber xwe bidin. Yakûb Beg ji ber van erîşan çû cem Tîmûr. Herçî Tîmûr welatê wî dîsa dayê jî lê ew nikaribûye bibe xûdan.

Piştî şeıe Enqere Tîmûr welatê Yakûb dîsa teslîmî wî kir, 1402, lê wî îttîfaqa xwe bi Qeremaniyan re xira kir û derbasî alî Osmaniyan bû. Ji bo ku zarokên xwe tunebûn, di sala 1429 an de w'elatê xwe ji Osmaniyan re cîhîşt.<31 51)Ewên ku desthilatdariya Osmaniyan qebûl kirin li wir man û bûne Tirk; yen din jî tevlî êlên din ê Kurd bûn û vegeriyan Kurdistanê. Iro konfederasyona Milan yek ji wan ê ku vegeriyane. Yek jî Qerekeçilî ne ku ji wê demê vegeriyan Kurdistanê. Ji bo ku ji rojava hatine hinek kes dibêjin ew Tirk in. Gelo her kesê ji rojava yan jî ji Xorasan hatibe dibe Tirk?! Min kaîdên wiha nebihîstine, lê wiha tê fêhm kirin. Ew jî ji îddea û nivîsên dîroknûsên Tirk ên bê bingeh tê.

Zorabê Aloîan, ji nivîskarê Macar Tibor General wiha radigihîne: Di salên 1440-1442 an de, pevçûn û şenin cûda cûda di navbera tîmên Osmaniyan û Macaran de çêdibûn. Tê zanîn ku di wan pevçûnan de, êla Germiyan û begê wan Osman jî beşdar dibûn, lê di sala 1442 an de eskerê Germiyan têk çûn... Gelek jêder didin xuyakirin ku Germiyan ji Kurdên Ezdî û Tirkmenan pêk di- hatin. Germiyanên li baçûrê Kurdistanê (Kerkük) di vê baweriyê de ne, ku ew bi koka xwe Ezdî ne.rl3M4> Germiyanên li başûre welatê me bi wan ve ti têkiliya xwe hene an na ez nizanim. Gor texmîna min ti elêqa wan bi hevre nîne.

Li ser Germi yani yan agahiya heri baş û balkeş ji alî Şahabettin Omerî ve tê dayın. Gorî ew dinivîse: leşkerên Germi¬yan cilên bi atlasa sor e li xwe dikirin. Ji alî din ve jî, li Kurdistan û bi taybetî jî li Me- letiyê qumaşekî zivistane yê bi navê "Sof" dihate hûnandin û leşkeren Memlûkan jî zi- vistanan ew li xwe dikirin. Li Amed û Sêrtê jî firotina hevreşîm dibû. Tiştekî din ê Ger¬mi yanı yê bi nav û deng jî hespên wan bûn; bi hezar

zêrî bûn û difirotin her alî.<31) Heta roja îro Kurdên Xorasanê di cejn û dawetan de cilên sor lixwe dikin û gelek kes dibêjin ew kincên Qazaqane, lê xuyaye ku di dema Germiyanan de jî wan ew li xwe dikirin.

Ibnî Betûta dibêje: Kurdên Germiyan ên Ezdî porê xwe jê nakin û bi çavên xwe dibîne ku ew çawa rê dibirin û talanê dikin.

Wê demê Tirkan ji wan Kürdana re digotin

"Saçakli Kurtler", yanê Kurdên bi gulî... u XoraSanê kincên sor

HIKUMETA EZAZ Û KILÎS

(1180-1620)

Çil sal berî vê rojê, pıra min ê rehmetî Ela Mamı Tozê, dema bi hêrs diket digot: "De here ma Mendola diya te bikutin!..." Kê dizanî dixvvest çi bibêje? Kê dizanî ku koka vê gotinê ji kudere tê? U kê dizanî ku gotinek veqas dem dirêj û bi bingeh dibe?!

Di sala 1022 an de serokê Ermanan Howhanes Senbat, ji qralê Bizansê Basil, bajarê Anî, Aladax, Qop (çiya) heya Melazgirê dixwaze. Birayê wî jî Qeyserî, Sêwas û Erepgirê dixwaze. Dema Senbat ew derana vala kirin Kurd lê bi cîhbûn. Kurde por dirêj û Ezdî bûn. Kurdênku ew hikumeta damezirandine jî divê heman Kurd bin.

Ew Kurdên ku Hikumeta Ezaz û Kilîs damezirandine jî du şaxen cûda ne: beşekî ji Kurdên Germiyan û beşek jî ji Kurdên Colamergê hatine. Ew li dora bajarê Qesîr, Entaqya, Cûm, Kilîs, Riha, Semsûr û Meletî dijîn. Dema Eyûbî hatin, ew dev ji hikumeta Helebê berdan û bi Eyûbiyan re bûn heval. Gava êla Hekarya hatiye, herduyan alikariya hevdû kirine û li bajarê Qesîr fermandariya xwe îlan kirine (1180) û Eyûbiyan jî vê yekê pejirandiye.

Li destpêke rêvebirî di destê Kurdên Ezdî de bûye, dema misiiman zêde bûne serokatiyê ji Ezdiyan stendine. Ezdiyan giraniya xwe didane Meletî yê; misilmanan jî dida ser Heieb û Enteqya yê. Kurdên Ezdî ji aliyekî ve bi Selçûqiyan re, ji aliyekî ve jî bi serokê misiiman re şer kirine. Ji wan Ezdiyan beşek zû misiiman bûbû û ji wan re Germiyan digotin. Dibe ku ewên li herêma Germiyan diman re gotibin. Wê demê mirov dikare bibêje, ku gelo dema ew ji navenda Xorasanê hatin li Meletî bi cîh bûn û piştre jî hinekan misilmantî pejirandin; ji yên pejirandî re jî gotin Germiyan. Me di beşa Germiyan de jî gotibû ku Germiyanan cîhên xwe ji Kurdên Ezdî û Badilî re hîştin û çûn rojava. Gelo dibe ku sedema vê çêbûne yek jî ol bû? Ew bi Selçûqiyan re, bi Kurdên bi cîhbûne û Dulqadiriyan re li hember Kurdên Ezdî yekitî çêkirin.

Pasê navê Germiyan gor Ibnî Esîr û Ibnî Xaldûn bi navê Dulqadiriyan ve yek tê xwendin...dibê ku yek bin? Belê dibe, lewrra serhejmara Germiyan gelek zêde ye, paşû êlên di bin sîwana hemû mîrîtiyan û dewletan de hertim cîh guhartine. Elinek parçe bûne; hinekan dawî li dewletê hatiye bi şûnde tevlî mîrtiyên din bûne. Yanê, tim û tim yek tevlî yên din bûye û yên lewaz mane tevlî yên bi hêz bûne.

Kurdên Hekaryan di dema serokê wan ê bi navê Mendo de dawî li fermandariya Ezdiyan anîn. Paytext, ji Qesîiê anîn Kilîsê. Gotina pîra min ê ji wî Mendo yî tê...Yanî wê demê em yan jî herî kêm êla me Êzdî bûye û Mendola ew mîrîtî û dewrana me xera kiriye ku ew gotin ji wê derketiye... Ji Mendo şunda kurê wî yê bi navê Ereb bûye serokê herêmê. Ew ji aliyekî ve bi xaçeperêstan re, ji aliyekî ve jî bi Kurdên Ezdî re şer kiriye. Pa§ê wî bi alikariya Eyûbiyan, Êzdiyên Hema, Mereş û Meletî kirin bin kontrola xwe.

Gelek şer û sereşî di navbera Ezdi û Misilmanan de derdikevin û di sala 1285 an de Kürden Ezdî bi serdikevin û serokatiya hikumetê didin Şöx

Bekir. Ji ber ku wî cûdatiyê nedikir navbera gelé herdu aliyan û li dijî erişen misilmanan radiwesta, Ezdiyan dîsa Hema, Mereş, Adiyaman, Meletı kirine bin deste xwe. Paşe ji aliyekî ve Misir-Eyûbî û ji aliyekî ve jî Kürden Dulqadirî nedihîştin ku hikumeta Ezdî di navbera wan de bijî. Serokê Remezanî, Dulqadirî û Germiyaniyan li hemberê Ezdiyan yekîtî pêk anîne û erişen mezin anîn ser vê mîrnîşîne. Ew her sê mîrîtî bi Misrê re girêdayî bûne. Di sala 1410 an de her sê hikumetan bi fermandarê Ezdiyan re dikevin tekiliyê û wî dixapînin û bi erîşan, welat dikin du parçe. Her çiqas bûne didu jî, li dijî neyaran em îttîfaqa wan dibinîn. Di sala 1460 an de Emîr Mîr Xelîlî bûye serokê hikumetê û wî îtîffaqê bi Mîr Şex Xelîl re çêkiriye. Misir li dijî vê derket, lê Mîr Xelîl guh neda wan. Di dema Mîr Hebîb (1499) de, xutbe li ser navê xwe dane xwendin û perê xwe çap kirine. Bi ser vê Misir di sala 1499 an de bi leşkerekî giran hatiye Helebê. Bi xayintî serok Hebîb li Helebê dikujin.

Di sala 1507 an de Siltan Eşref Qansû fermanekê derxistiyê û leşker civandine. Remezanî, Misirî û hinek Ezdiyan jî eriş anîn ser hikumeta Kills. Serok Mîr Şex Izzeddîn leşkere xwe di çiyayê Seyhûn de bi cîh kir û ew kirin kemîne û têk bir. Şere wan heta sala 1515 an dom kir. Sînan Paşa davvî li Remezanİyan anî. Dulqadirî li bakûrê wan bûn, ji bo ku dijminên wan jî hebûn, di nava wan da şer derneket, berovajî vê ew diçûn hewara hevûdû. Di dema serok Qasim de, yanê di salên 1516-1517 an de bi Yawûz Selîm re tevhev li hemberê Misir dest bi şer kirin. Piştî şere Misir; Yawûz bangî vî serokî û küre wî Canpolat kir û ew çûn Stenbolê. Bi gotinekê din serokê Helebê Qerece ji Yawûz re nameyêke dinivîsîne- dibêje eger ew vegere ewê li dijî Osmaniyan serî hilde- û Yawûz hemû serokê Kurd û hevalên wan dikujê û kurê wan dike qesrê. Bi ser vê bûyerê de Mîr Şûx Izzeddîn dîsa dibe serok, lê bi fermanên Osmaniyan dimeşin. Di sala 1530 an de ev serok dim ire, ji bo ku kurê xwe tunebû, serokatiya

binamalê dikeve destê Eyûbiyan (Melîk Muhammed). Di vê salé de dawî li serokatiya Kurdên Ezdî tê û Kurdên misil man bi navekî din dimeşînin.

Tê zanîn ku di navbera Osmaniyan û Kilîsê de gelek peyman çêbûne, lê Osmaniyan ew sozên ku dabûn yek jî bi cîh neanîne. Kurdên Ezdî bi Eyûbiyan re û bi Kurdên din re tim şer kirine heta Huseyn Paşa çûye Helebê. Wî ji Stenbolê re nameyek nivîsandiye ku ji bilî mala Mendo ti kes wan Kürdana nikare bîne rê. Li ser vê sîretê, Stenbolê Canpolatî şandiye. Canpolat di sala 1540 an de tê welatê dê û bavên xwe. Kilîs kir paytext û mîrîtiya Kilîs, Qesir, Ezaz, Enteqya, Sûm-Cûmê heyna ser xwe... Di rûpelên dîrokê de êdî ewê bi navê Can pol atan werin xwendin û nasîn.

Roger Leskot dinivîse ku: Torino Mend, mîrê yekemîn yê Kilîsê û çiyayê Kurmênc bû ku heta Sûriyê ji aliyê Siltan Selîmê 1 an ve hate girtin. Hingê, Mendan bi destê wî Siltanî ketine bin fermandariya serokekî Ezdî yê bi navê

Izzeddîn. Dema Silêmanê Mezin hate ser text, Mend an dîsa desthİlatdarî girtin. Lewra Şex Izzeddîn Mîr Beg ti law li pey xwe nehîşt. Dema Osmaniyan mîritî bi xurtî bi xwe ve girêdan, dawî li vê mîrîtiya hanê hat.(13217) Êla wî Izzeddînî dê piştre wek Oxçû bê binav kirin.

HIKUMETA BABIRYAN

(Xelebirkan-Zarên Mildirêjan)

Dîrokzanê ErmenîKiraqosê Gêncê û Werdan dibêjin: Hikumeta Atabegê Babiryanê bi navê Xeleberîkanê ji welatê Babiryan in. Gereg ew welatê hanê li dora Gêne yan jî Gurcîstanê be. Werdan jî dibêje: Zarokên Serkîs yên bi navê Zakare (Zekerya?) û Iwan bi eslê xwe Kurd in û serokê Kurdan in. Xwediyê

Tarîxa Elî, ku di sala 1578 an de li Gurcistanê bûyerên di nav leşkeriya Osmanî de dinivîsand jî dibêje: ew ji Kurdên (Gêncê) Qerebaxê ne. Dema serokêGürcan Dawid Saslon mir, welate Kurd, Ermen û Gürcan kete bin destê Kurdan.

Di sala 1120 an de Zekerya hemû Kurd, Ermen û Gürcan li dora xwe dicivîne. Di sala 1161 an de bajarê Anî yê heytînin. Di sala 1191 an de Zekerya û Iwan-Ohan dawiyê didin hikumeta Şadiyan û pay text ji Lorî (nêzîkî Anî ye) yê tînin Anî yê. Hemû der û dorên Sariqamiş, Qers, Eleşkirt, Qaxizman û gelek cîhen din zept dikin. Di sala 1192 an Şadiyan dîsa Anî ji destê Babiryan derxistin; lê 1200 an dîsa heynan. Di wir de, bi dîtina min beşek Kurd li dora Zekeryane û niqta din jî di navbera Kurdan de dubendiyek xuya dike; dibe ku sedema vê yekê cûdabûna olî ye. Lewra, xuyaye ku Kurdên li dû Zekerya diçin xiristiyanî yê pejirandine.

Di sala 1210 an de serokê Eyûbiyan ê Meyafarqînê Melîk Eşref dibe. Zekerya erişe tîne ser welatê wî û hemû deran talan dike. Paşû Eşref ûrîş dike û îwan dîl digre û bi ser vê de Iwan xuşka xwe dide Eşref û dibin xismên hev û aştî pêktînin. Gava Gûrciyan di sala 1220 an de erîş anîn ser welatê Iwan, wî ji Eyûbiyan alîkarî xwest û dijmin ji welatê xwe derxist. Di wan salan de jî, di navbeyna wî û Gûrciyan de nakokî hene û ji Kurdan alîkarî dixwaze.

Dema Tataran di sala 1239 an de ûriş kir, miletên mîna Kurd, Çerkez, Laz, Ermen jî penaber bûn. Beşek Kurd ji Qefqasya çûn Macaristan, Bûlxaristan, Arnawût û Romanya; Ermen jî çûn Kîlîkya. Hêza bi navê Dirêjan a ku niha li dora Meletî dijîn, di vê demê de hatin. Ev qebîleka ji Dirêjên Qerebax in. Bi qasî em dizanin girêdaneka Dirêjan bi Kurdên li navenda Anadolê yen em ji wan re dibêjin Canbegan jî heye. Mumkune ku ew girêdayî yek federasyonê ne.

Hukumdarê Osmanî Qanûnî, ji serokê Kurd Melîk Zahirê Elbakî (Başkale) cîhekî dixwaze, ku peşiye li Sefewiyan û Şîiyan bigire. Li hemberî vê yekê, Qanûnî serokatiya herêma Bosna-Hersekê heta Kîevê da Zahirê Elbakî. Niha li vê herêmê 160 şûn û warên navên xwe bi kurdî ne hene. Berê jî li wir Kurdên xaçperest hebûne. Hozê bi nav Dirêj-Terjan-Jeno bi ûrîşa Tataran ji welatê xwe reviyane li Macaristan bi cîh bûne. Ew malbatên ji Kurdên bi navê Babiryan in, ji qebîla Xelî-Elîkan in. Cara yekêm li bajarê Lorî serokatî kirine û piraniya hozê wan li dora Gênce-Qerebaxê ne. Gurcî ji wan re Maxar- gerdzelî-dze- (zarokên mil dirêjan) dibêjin. Ew wek Kurdên Mamokiyan cara ewil ola xaçeperestiyê ji xwe re pejirandine. Paşê çûne ser Ortodoksiyê û bi Gûrciyan ve ji heman olî bûne. Berî zayina Isa û piştî zayina Isa jî Kurdan serokatiya wan kirine (Daîret Mearif el Islamiye).

MOXOL

Li destpêka 1200 an gelé Cengîz Xan ên Moxolî ji rojhilat û Asya Navîn bi armanca dinyayê bigrin destên xwe, derketin rê. Bê guman bi hatina wan ê rojhilat re gelek miletan zirar dîtin. Di serî de gelek Kurdan cîhê xwe terk

kirin, hinek çûn herêmên çiyayî û gelekan berdêla vê yeke bi can û male xwe dan. Ew yeka ji bo miletên din wiha ye. Li hember wehseta Moxolan kesekî nikaribû xwe li ser piyan bigire; tene Kurdan evv erişen wan û hovitiya wan kêm kirin û carna jî têk birin. Bi taybet jî kalên Kürden îro li dervayê welat dijîn, piranî bi şere gerîlatî gelek zirar dan Moxolan. Gelo çawa ew weqas zirar dan gelan? Larsson dibêje: Mirov nikare şervaniya wan û hejmara hespên wan ên digihîşte nîv milyonî inkar bike.(7Ğ) Bi serhejmara xwe ya pir û bi hovitiya ku wan dikir li ser gelan gelek bandoreka mezin dihîşt. Yani gelen din, beri şer di ware psikolojik de têk diçûn.

Moxol hin nehatibûn Kurdistanê şervaniya Kurdan bihîstibûn. Xanê mezin Mûnge, ji bo ku xaka Kurdistanê û xelifetiyê dagir bike birayê xwe Hulagû şand rojava. Talimata ku daye Hulagû balkeşe: Yen ku ji te re stû xwar kirine re rind be, asiyan bipelçiqîne! Keleh û şûran hemûyan bi erde re bike kavil. Koka Lor û Kurdan bikole! Kelehên wan eşkiyayen mina Kerdeh-Kuh û Lembeh- şer ên ku gerokan ditirsinin ji hole rake!(65) Em nizanin ku ew kîna wan ji çi dihat.

Hinek nûser dibêjin erişen Moxolan di derdora salên 1212 an de(116' 17)gihîştin Kurdistanê; tabî berî wê jî gihîştibû Kurdên li navenda Xorasan û herêmên din ên Kurd lê dijîn. Gelên li bajarên mina: Ezingan, Erzirûm, Palu û dora wan deran, li deşt û dora çiyayan dijiyan, reviyan serê çiyan û nav daristanan; gelek jî çûn ser herêmên çiyayî yen mina Ezinganê.(116_17) F. Sumer dibêje: di sala 1219 an de dora Seyhûnê gir tin, li başûre Seyhûnê ji êlên Tirkmenên koçer 10 hezar kes gîhandin hevdû û di fermandariya Tavnal Noyan de şandin ser Harîzm. Di rê de, Tirkmenan serî hilda, berpirsiyar kuştin û Taynal jî di nav de gelek kes kuştin.11311351 Sedema kîna wî ew bû an na em nizanin. Bi ser vê de Tirkmen reviyan Xorasan, Mêrv û Amûyê. Bi vî awayî Tirkmenên li welatê xwe mabûn bi piranî li Xorasanê civiyan.(l3l135) Mumkune ku wrana ewên ku Dîmîtrof qal dikine ne. Tirkmenên ji Seyhûnê hatibûn Merv û Nesayê, dibêjin ku 70 000 eskerên xwe hebûne.(131'14ét Bi hatina Moxolan û hovitiya wan re gelek Kurd jî vekişîn çiyan û derbasî parastinê bûn; miletê ku li hember Moxalan sekinî tenê Kurd in. Ew êlên reviyabûn li çiyayên Ezingan, Dêrsîm, Akçadax û Mere§ê bi cîh bûn. Ji alî Moxol, Îlhanî û Osmaniyan ve gelek zilm li wan hatin kirin û ew yên Sersor bûn.(127l9) Tê fêhmkirin ku ewên li çiyan hîna jî baw'eriyên xwe yên berê diparastine. Yanê wek Sersor yan jî Qizilbaş dijîne. Çîn, Afganistan,

Qeşmîr, Iran ketin destên wan û Cengîz di sala 1240-41 an de mir. Law'ê wî Batû, ji 10 salan bi şûnde gihîşt Rusya û rojhilatê Ewrûpayê.(76)

Selçûqiyên ku navenda xwe li Iranê bû, di dawiya sedsala XII an de belav bûn û şûna wan Herzem derketin holê. M. Emîn Zekî dibêje: Kurdên Zagrosan, di sala 1217 an de hêzên Herzem§ahê ku ji Hemedanê şandibûn Bexdayê têk birin. Cengîz Xan jî di salên 1219-20 an de Harzern têk bir. Celaleddîn êrîçî keleha Axlatê kir, fermandarê kelehê yê bi navê Hecîp Hisamê

Kurd, qehremaniyek mezin nîşan da û keleh parast. Lê paşe Eşref Eyûbî, wî fermandan bi dur xist û di şuna wî de izzet Aydek şand, wî jî qehremanê Kurd kuşt,(19> Her çiqas sedem tunebe jî, li gorî dîtina me Eşref ji xwe tirsi ku Hecîp jê re bibe reqîb û ew dewleteka Kurd avabike. Celaleddîn dest bi revê kir û li herêma Mûşe qirkirinek pêk anî û ji bo vê xelk koçî Helebê kir. Di sala 1226-9 an de Celaleddîn ji ber Moxolan revî û xwe avêtbextê Kurdan, lê di 1231 an de ji alî Kurdekî ve hate kuştin. Yen din ku ji ordiya Harzern mabûn batin aliye Xarpûtê û ewderan talan kirin. Di sala 1230 an de Eyûbiyan bi Selçûqiyan ve li dijî Moxolanîttîfaq çêkirin û ew têk birin. Moxolan li alî Wan, Amed, Mêrdînê talan kirin û gelek mirov kuştin. Lê nikaribûn di aliyê Dêrsîm û Hewlêrê re têkevin hundir.(2)

Di derdora sala 1250 an de, aliyê Semsûrê kete bin destên Moxolan, gelên vî bajarî ji tirsan warê xwe terk kirin û xwe avêtin paş Memlûkan. Baybars bi wî gelî ve erîşî Moxolan kir (1277) û ew têk birin.<109"3) Bi erîşen Moxolan re gelek mirîtiyên Kurdan yen mîna Germiyan li vê herêmê jî belav bûn; bi vî awayî tevlîheviyeke mezin di nava Kurdan de pêk hat, ku hîna jî Kurd derdê vê yekê dikişinin. Moxolan ji vegera talankirina Ezerbeycanê şunda, erîşî Ezinganê kirin û bajar bi erdê re kirin yek. Ji ber hovitiya wan, gelên herêmê û dewlemend reviyan Heleb û Suriye. Sûbaşiyen Meletî jî deriyê bajêr vekirin û reviya Helebê. Bi vî

awayî, gel di sînora îro ya Tirkiyê û Kurdistanê de, yan çûn rojava, yan çûn çiya û yan jî xwe avêtin paş Memlûkan.

Di sala 1256 an de dema Kurdistan kirin bin destên xwe, ji ber vê yekê gelek Kurd li Meletî, Xarpût, Firat û Mûsilê bi cîh bûn. Bi ser erîşa Moxolan ve Qerekoyûnî jî di bin serokatiya Tûre Beg de bi 30 hezar konan ve hatin herêma Erzirûm û Dîgorê. Ew ji êla Beranî bûn.(43) Navê Qerekoyûn-Pezreşan ê kurdî Beranî ye; sembola wan beran e û ji ber vê kevirên ku çêkirine jî hemû beran in, hatina wan gelek girînge ku emê li pâş li ser rawestin. Tişte din ê balkeş, O. Tûranî bi xwe dibêje û her çiqas bixwaze veşere jî ew nikare: Di sala 1260 an de ev li Kurdistan û bakûre Sûriyê xuya dikin û piştî 100 salan bi şunde em wek Pezreşan dîsa rastê wan tên... Ew, ji berê Oxûzan yê Yaziranê û bi kurê Selçûq re şer kirin. Dema dewleta wan hilweşiya derbasî Xorasanê bûn û di bajarê bi navê Yazir ê bi xwe sazkirin de bi cîh bûn. Bi hatina Moxolan re beşek ji wan hatin Anadolê.(43) Bi vî awayî em fer dibin ku ji ber erîşan ketin tevger û rêwîtiyeke dûr û dirêj.

Di dema Hulagû (1257) de jî, Kurd çûn ser çiya û ji dijîminên Moxolan re dia kirin ku bi serkevin. Moxolan erîşî Kirmanşah kirin, gelek kes kuştin û bajar talan kirin. Dagirkirina Bexdavê bû sedema vala kirina Şehrîzor. Gore Şahabeddin Omerî qal dike: Kurden li wir koçî Sûriye û Misir kirin.(2) Divê ew Kürden Lêkbin, piştreewû disa berbi bakûrê Kurdistanê biçin. Eşîreten Lawan û Baban jî koçî Cizîrê kirin (dema min lêkolîn dikir, Kurdekî Şexbizinî got: em ji Cizîrê hatine û hîn gundên li ser navê me li wir in). Elên Kurd ên bi navê Laden û Badin ên li Cezayir jî, wê demê welatê xwe terk kirin.(2) Hulagû, di sala 1259

an de ji Ezerbeycan dîsa derbasî Sûriyê bû û Kurdên li Çolemêrgê hemû di şûr re derbas kirin. Bajerê Kurdistanê yek bi yek ji destê Eyûbiyan girtin û kirin bin desthilatdariya xwe. Hayton, di dema Abaka de ordiya Misir di

sala 1278 an de li bakûrê Sûriyê 5000 malên Kurd bi dest xistin. Lê arteşa misilmanan ya ji Tirkmen û Kurdan pêk dihat, Kilîkya talan kirin. Erişen Moxolan hêza siyasî ya êlên Kurd ji hole rakir, Memlûkên Misirê ji bo ku ji Ilhaniyan xelas bin dixwestin ji Kurdan îstîfade bikin. Memlûkên desthilatdarê Misir û Sûriyê bûn, Moxol têk birin û heta Qeyserî peşta çûn. Bi ser vê de Selçûqî bi Moxolan re bûn yek, gelên din jî bi hevre bûn yek.

Heleb û Şam heta sala 1260 an, Himus 1262 an, Hama 1341 an, di destê Eyûbiyan de bûn. Heta sala 1235 an Semsûr jî di destê wan de bû, paşe bi êrîçên Moxol û Selçûqiyan ji dest hate derketin. Di sala 1242 an de em dibînin ku li herêma Riha û Helebê 30 hezar xane (wargeh) Kurd hene û bi Eyûbiyan re hevkariyê kirine. Ew koçberana di bin serokatiya kurê Davvid de bûn, tenê ji beşekî ku ji ber Moxolan reviyabûn.(43)

Di dirêjiya dîrokê de, erişen Ereb-misilmanan û yen Tirkan hestiyê pişta Kurdan şikandin; Kurdan zirara mezin a sêyemîn jî ji Moxolan ditin. Wan bi komkujî û xwîn rijandina xwe, Kurdistanê ji seri heta binî di nava xwîn û agir de hîştin. Di serdema Moxolaxa de jî hîn beşekî Kurdan li Asya Navîn bûn. Bi hatina Moxolan re tene Tirkmenên Mangişlake zirar nedîtin; ew ne li ser riya wan bûn. Piraniya wan jî Tirkmenên Salûr bûn; ji her êlekê hebûn, lê heri zêde Eymûr, Doxer, Ixdir, Çavûldûr, Karkin, Salûr û Axar hebûn. Serokatiya wan jî Kilik, Kazan û Qereman Began dikir.(13l lb2) Bi bandora Moxalanji Ezerbeycan û Xorasan koça duyemîn a mezin berbi Anadolê pêk hat. Li Eleşkîrte 60.000 mal berbi Xelatê vekişî. Bi qasî wan jî ji Ispîr, Baybûrt û Pasînê berbi Ezingan, Sînop û Dîlok belav bûn. Tirkmenên ji ber Moxolan direviyan li herüber Bîzansan hê bi cesaret bûn; ji Qastamonû û Çanqiriyê diketin sînorên Bîzansan. Rûm jî ji ber wan direviyan Îzmîtê. Gor Îbn-î Sait, li Denizli 200.000, li Qastamonû 100.000 û li navbera Kutahya-Qerehîsarê jî 30.000 konên Tirkmenan hebûn.1115-

271 Careka din bejim, ku dema Tirkmen tê nivîsandin gereg Kurd bê fêhm kirin. Kurdan xwe ji êr avêtine mer û ji tirsa Moxolan bi Bîzansiyan re hîn xûrttir şerkirin û ketin nava Anadolê. Yekê jî, serhejmarên ku ji alî gerokên wê demê têne dayin jî mezinbûna koçê didin xuyakirin. Di sedsala X an de tê texmîn kirin ku nifûsa Anadolê 8-10 miljon bûye. Bajaæ mîna Riha û Meletî nifûsa xwe digihîştin 35 hezaran.(23) Dema Moxolan jî texmînî 10-12 milyon dikare bibe, ku yen navê xwe li jor têne diyarkirin tenê, bi giştî dikarin du milyonan bibinin.

Nivîskarên Swêdî dibêjin: drîşa Moxolan û ya Tîmûrlenk, ji bo Alanan bû felaketek; hinek ji ber revîn Macaristan û bi navê As li wir navdar bûn, binek ketin şer û hinek jî tevlî Moxolan bûn. Alan ji êleka Iskîtan e.(153 29) Wekî di beşên derbasbûyî de jî me diyar kiribû, Alan êleka Kurdên dimilî ye, ku têkiliyê xwe bi Macaran re çêbûne. Lê gor texmîna min, nûserê Kurdên li vê

herêmê giştikan bi navê Alan didine xuyakirin û ew nabêjin ku ew Kurd in jî, di Kurdbûna wan de ti guman nine.

Moxolan, ji Erzirûmê heta Qeyseriyê 500 hezar; ji Bexda heta Qeyseriyê jî tevhev 6 milyon mirov kuştin. Ji bajarê Merv 1.880.000, Bexda 2 000 000, Semerqent 200 000 hezar kuştin.(17) Wekî dinivîsîn nebe jî, li gor nifûsa wê demê mirovên ji alî Moxolan ve hatine kuştin gelek in. Di sala 1257 an de Moxolan paytextê Medan Ekbatan (Hemedan) û di sala 1258 an de jî Bexda heynan û dawî dan birêvebiriya Ebbasiyan. Di sala 1300 an de Kurdan di bin serokatiya hukumdarê Mûsil Lolan Bedrettin de li dijî Hulagû Xan serî hildan û 50 hezar mirov mirin. Kurden ku dîl hatibûn girtin di bazaran de bi 12 dîrheman hatin firotin. Serûbineke mezin çebû û koçên mezin pêk hatin. Kurdên li Xorasan, Kirmanşah û Hemedanê hatin koçber kirin. Ela Kureso (Bawer dikim ev Zazayên li Aksarayê ne) bi Tataran ve ketin şerekî dijwar, şere di bajarê Tanza de, Tatar

ravvestandin, lê paşe Kurd têk çûn û hatin Mêrdînê, paşe jî çûn Akşehir û paşe jî çûn Dêrsîmê, herêma Zevê.(39)

Bi dîtina Burkay, bi van ûrîşan re Kurd berbi rojava hatin leqandin. Bi vî awayî Kurd, heta Sêwas, Mereş, Qeyseriyê çûn û li Qonya û Enqerê koloniyên Kurdan çêbûn. Gor Kocadax jî, di vê demê deTirkmenên Begdili û Afşar bi êlên mîna Qerehitaya û bi eşîren din ve, ji ber Moxolan mal û warê xwe terk kirin û çûn Anadolê.(17) Prof. Tûran jî dibêje: Tirkmen ji ber Moxolan bi komeke qasî 60 hezarî û di bin serokatiya Azad Mûsa de reviyan û zirar didan der û dorên xwe. Li Trabzon, Gürcistan, Axlat û heta Baybûrtê û Ezinganê belav dibûn. Moxolan di bin serokatiya Tokû Noyan de artûşek şandin û ew berbi Rojavayê Anatolê ajotin.(43) Gereg bê zanîn û me di beşûn derbasbûyî de jî gotibû; ku Kurd beri Moxol werin jî li Navenda Anadolê hebûn. Bê guman Moxol bûn sedema gelek serû binbûna êl û zendan.

Ebû B. Tehranî agahiyên giranbiha radigihîne: Bavé Pezgewran ê VI an Idrîs, di destpêka sedsala XIII an de hinek keleh û herêmên li Amedê birêvedibirin. Torinê Idrîs, Pehlivan Beg jî serleşkere keleha Alîcaka li Nahçiwanê ye. Pehlivan, bi zora waliyê Moxol Curmagun di sala 1330 an de çû rojavayê Anadolê.<H4'70) Ji bo me girînge ku ew ji Aran hatine Amedê, ku îhtîmaleke ew kalên Têrikiyên îro bûn û ew êla Pehlîvanli ya di dîroka Osmaniyan de derbas dibe ji wî begî tê. Pehlivan, bi serokên Tirkmenên din ve li dora Bûrsa li hember Bîzansan tekoşîn da bişûnde vegerî Amedê. Lawê wî Tûr Elî (1300-1365) li pêş 30.000 konî beşdarî sefera Sûriye yê Gazan Xanê Moxol (1300) bû. Jêderên Memlûk dinivîsînin; ku di nava sedsala XIV an de, şaxekî êla Bayindirên (wek Dulqadir û înal bû du şax) koçber ji Bûzûkî, Bayat, Doxer, Avşar, Bexdili, Eymûr-Remezan, Kinik û yên din ve li bakûrê sînorên Memlûkan (Misir-Sûriye) bi cîh bûn. Ihtîmaleka pir mezine ku Bayindiran piştre Akkoyûnlû-

Pezgewr avakirî ji ber ûrîşûn Moxolan hatin van deran.(,u 70) Ew êl û federasyon ê piştre bi navê Tirkmenên Heleb, Boz Ulûs, Avşar û hwd bên xwendin.

Moxolên êrîskar, Kurdistan û Anadol wek kaniya hebûnê dîtin û çi bidîtana ji holê radikirin û dixwarin; ew jî bû sedema hilweçîna wan. Yanî kanî ziwa kirin û dawiya wan ê siyasî jî bivê re hat. Nivîskarên tirk jî dibêjin: Li hember wê, Siltanên Selçûqiyên ku 200 sal berê Anadol ji bo xwe wek welat dîtin, êl hîşyar kirin û wan wek Moxolan nekir. Dema Oxûz hatin Anadolê dest navêtin gund û bajaran. Hêdî û bêdeng ketin nava rûniştvanen Anadolê û têkilî peşxistin.(U112) Wexta Oxûz-Kurd hatin, xwedî pez û dewlemendî bûn; ji bo ewlekariya xwe demeke kin li çiya jiyan û pezê xwe xwedî dikirin. Gor nivîskarên cûda radigînin bi hezaran pezên wan hebûne. Ne wekî nivîskar dibêje li ser hişyarkirina Selçûqiyan dest navêtibûn gundan û hebûna xelke.

Li hember Moxolan tenê Tirkmenên koçer li berxwe didan; Selçûqiyan nikaribûn nişstecîhan û koçeran bigihînin hev û li hember Moxolan bisekinin; berovajî wê, li hember Tirkmenan bi Moxolan re bûne yek. Siltanê Selçûqî ketin bin desthilatdariya Moxolan bi şûnde, Tirkmen bi temamî li hember dewletê bûn asî. Ji ber vê, Hulagû di sala 1256-65 an de ferman da, ku Tirkmenan bi zorê bişînin cîhên din. Bi vê fermanê re, Moxolan derbên mezin li Tirkmenên Sêwasê, Qeyserî û Axaç-Eriyan xistin. Piraniya wan çûn Memlûk û xwe avêtin paş dewleta Misir. Ibn Şeddad radigihîne, ku di dema Siltan Baybars (1260¬1277) de, ji 40 hezarî zêdetir malên Tirkmenan hatine. Ewe ji Gazzê heta Antaqya û Sîsê bi cîh kirine.(i3l'180) Ew belavbûn û fermana li hember Kurdan, roja îro, di belavbûna Kurdan de jî xuya dike. Kurdên li cîhên dûr belav bûne encama van êrî§ên dîrokî ne. Ihtîmaleke mezine ku Kurdên çiyayê Elewî wê demê çûn.

Avcioglû îddea dike ku Kurd û Tirkmenan geliyê stratejik girtin û li ber derbasbûna Moxolan bûn asteng. Keykavûs emir da, ku ji Kurd û Tirkmenan leşkeran kom bikin û kurê Şex Adî yê Ezdî da birêvebirina bajarên mîna Meletî û Xarpûtê. Di şere bûyî de Moxolan leşkeren Tirk û Kurdan tek birin. Keykavûs serleşkere jîr Elî Bahadir şand Meletî û Meletiyan Keykavûs naskir. Lê Elî Bahadir jî têk çû. Ebûl Farac jî dibêje, di sala 1243 an de Hulagû erîş anî ser Meletî û gelé Meletî reviya Helebê.(48) Memlûk ku aboriya xwe baş û xwedî leşkeren baş bû, Moxol têk birin û beşekî girîng ê Anadolê tevlî xaka xwe kirin. Tirkmenên dijminên Moxol amadebûn, ku ji Memlûkan re hevkariyê bikin.(24) Di sala 1275 an de Begê began ê Amed û Xarpûtê yê bi navê Hatiroglû di nav hev de peyman çêkirin ku gazî Baybarsê Memlûkan bikin, lê ew nehat û di dawiyê de Memlûkan Moxol têk birin. Dewleta Ermeniyan jî bi Moxolan re hevkarî ji holê (1375) rakirin. Qaraca Beg li Elbîstanê dewleta Dulqadiran bi Memlûkan re girêdayî (1337) a va dike. Ew Tirkmenên ku qal dikin Kurd in û sempatiya Kurdan ya ji Memlûkan re sedema xwe yek jî ev e. Ji bo vê heta dema Yawûz herêma ku di destê Kurdên li dervayê welat de heta Meletiyê di destê Memlûkan de bû.

Kurdên li Sûriyê alîkariya Memlûkan werdigirtin û bi piştgiriya wan jî hebûna xwe parastin. Di sala 1279 an de Moxolan ji bakûrê Sûriyê û Kîlîkyayê

pêne hezar malbatên Kurd bi xwe re birin. Di dema Olcaytû (1308-1316) de navenda eyaleta Kurdistanê ji Baharê hate neqîl kirina Siltanabadê û eyalet xirab û bê îmar ma.(15n'22) Di dema Olcaytû de, di nav arteşa kıı Cilan dagir kirî de Kurd jî hebûn (1315). Ji demekê şunda kesekî bi navê Mûsa xwe mehdiyê Kürden Şîî ilan kiribe jî, ji alî Olcaytû ve hate îdam kirin.(;,1) Tişte balköş ewe, ku Olcaytû Şîîtiya 12 îmaman qebûl kir ku ew jî bû sedem ku Tirkmen bi Mox- olan ve nêzîkî hev bûn û pewêndiyen wan

baş bûn.(112'lü> Di dîrokê de, gelek caran tê dîtin, ku dema rêvebirê Tirk, Moxol û Osmanî diketine tengasiyê ola xwe jî diguhartine.

John E. Woods dibêje: Hemû nivîskar, lêkolîner yekdeng in, ku ha- tina Moxolan wek xencereka berê xwe daye dilê Islamê bû. Encama erişen Moxolan, Cengiz Xan û Tirkên hîna li rojhilat ew bû; ku Tirkmen û gelên din ên koçber, ji Asya Navîn; li Iran, Iraq, Sûriye û Anadolê belav bûn.(U4 141 Ne tenê xencereka ser dilê îslamê bû, ew li ser dilê hemû mirovatiyê bû; bi taybet jî li ser stûyê Kurdan. Bi ârîşa Moxolan re Tirkmenên li Xorasan, Maverannehîr û Turkîstanê rêviyan û hatin Anadolê.(148196) Ew rastiyeke lê Tirkmenên ku tên qal kirin Kurd in. Erişen Moxolan di navbera salên 1243 -1335 an de (92 sal) pêk hatin û Selçûqî jî ji hole rakirin.(39) Tirsa Moxolan rabû şunda, li ser kelepûra Selçûqiyan 19 mîrnîşîn û dewleteka bi navê Eretna saz bû. Ji vana Kutlûşahlar (1340-1393); Amasya û Dulqadirogullari (1337-1522), Elbîstan, Mereş, Qeyserî, Elezîz, Dîlok û Meletiyê, 17 mîrnîşin jî li rojavayê Anadoliyê hatin saz kirin. Ji wan mîrîtiyana piraniya xwe yen Kurdan bûn.

F. Sumer îddeayeka balkeş tîne: Tirkên mîna Ûygûr, Karlûk û Kipçak bi hatina Moxolan re heliyan; wan bi Moxolan ve qewTmên nû anîn holê. Ozbek, Kazak, Qere Kalpak û Tirkên rojhilat ji vê peyde bûn. Tîmûr jî minakek ji wan a ye.(131-162) u ser pirkbûna Karlûk û Kipçakan gumanên min hene, bi qasî min lêkolîn kirî, ew ne Tirk in. Ku ew Tirk bin yan jî Kurd (Ter û Goran) bin jî, di vê têzê de rastiyek heye. Mirov îro jî sopa vê yekê dibîne û gelek mirovên naşibin Tirkan, Kazakan û Ezeriyan hene û di nava sînorên wan dewletana de dijîn, ku di bingeh de ti têkiliya wan bi Tirk û Moxolan ve nine.

TIMÛR

Ji sîlîndira Moxolan ya ku ji ser gelan re derbasbûyî bi şunda, afata Tîmûr destpêkir û di demeke kin de gihîşt Kurdistanê. Di sala 1393 an de

Mazenderan dagir kir û derbasî nava başûrû Kurdistanê bû. Bixwe êrî§î ser Loristan û Huzistan kir û heyna. Di sala 1394 an de bat bakûrê Kurdistan û Anatoliyê.

Vê demê li Ezinganê Mûtahharten desthilatdar e û bi dewleta Qadî Bûrhaneddin re tim di nava nakokiyan de ye. Mûtahharten yekser girêdana xwe peşkeşî Tîmûr kir. Ji tirsa Tîmûr Meletî vala bû û Sûlî Begê Dulqadir qasid ji Tîmûr re şandin û ew teşwîqî heynana Sûriyê kir. Emîrên Dîvrîxî û Darende

reviyan. Êlên Tirkmen û Moxol (Hûn vê yekê wek Kirmanc û Lor/yan jî Zaza fêhm bikin) koç kirin (jeder: Bezm û Remz).(35J Tîmûr, hate ber Sêwasê û got: Eger ew teslîm bibin ez sozê didim ku xwîn narije. Sêwas teslim bû. Tîmûr soza xwe girt xwîn nerijand, lê kort kolan û bi hezaran gel bi zindî kire wan çalana ku soza xwe bila were şûne.<89 29) Dema hate Sêwasê Ahmet Celayir û Qere Yûsûf ji ber revîn Helebê; ji wir jî revîn ba paşayâ Osmaniyan Beyazît. Di sala 1400 an de berê xwe da Sûriyê û Misirê. Di heman salé de nêzîkî Helebê bi Misriyan ve şer kir û Misrî ji ber hovîtiya Tîmûr reviyan û Heleb kete destê Tîmûr. Di sala 1401 an de Tîmûr tê Wêran§ehrê, li wir dibêje: " Kevir li ser kevir, serî li ser mil mehêlin!" û bi rastî jî gotina xwe tîne cîh û bajarê ji 40 hezar mirovan pêk dihatî, kes namîne.(93'56) Ji wan mînakana jî diyare ku Tîmûr li Kurdistanê û cîhên ku Kurd lê dijîn komkujî û vvehşeten mezin pêk anîne. Bê gnman ew jî dibe sedema ku gel ji şûn û waren xwe barkin herin derên çiyayî, cîhên dûr yan jî têkevin bin desthilatdariya hêzên mezin.

Bi vê re girêdayî û ji bo babeta me R. Bîlaaga niqteyeka balkâş destnîşan dike û dibêje: Li destpêkê Tîmûriyan û paşê jî Pezgewran gelek Tirkmen û Beranî ajotin Ezerbeycanê. Dema Tîmûr di sedsala XIV an de ji sefera Anadolê vegeriya; Oxûzên di dema Selçûqî, Harezmşah, Moxolan de ji Iran çûbûn Anadolê, Sûriyê û Balk anan vege riyan Iran û Ezerbeycanê.

(95~92) Di vê serdemê de jî tê îspat kirin; ku dema hêzên xwînxwar êrîşî ser welatê Kurdan dikin, ew dibe sedema koçberiyên mezin, Bi vî awayî jî hinek êl bi temarnî hinek jî bi parçe parçe barê derên din dikin. Encamê ve jî îro berbi çav e...Ew êlên Kurd ku ji Anadolê derketibûn ê piştre dewleta Safewî damezirînin. Tevgera Şah Tsmaîl di saya wan de li jiyanê ma. Vana komên mîna: Şamî, Ustacaî, Rûmî, Mûsilî, Qaçar, Qereman, Afşar, Zulqadir, Kawî, Cûzan, Tekeî, Baharî, Bexdilî, Çegenî, Pûrnak.. .hwd bûn.(95'92) Parçeyên van êlêna îro em li Anatoliya Navîn, Xorasan, Qefqasya, rojavayê Kurdistanê û li Sûriyê dibinin.

Ji êrî§ên Tîmûr, Asûrî û Suryaniyan jî para xwe girtin. Layard dibêje: Ji Hulagû bi şûnde, Tîmûrlenk bi nefreteka mezin erîşi Asûriyan kir. Ji bilî yên ku xwe avêtin kelehên li Kurdistanê, ku nayê dagirkirin, hemû hatin kuştin. Ji sala 1413 an de bi şûnde, ji bilî Kurdistanê li ti cîhên din qala dêrên Nastûrî nayê kirin.1681 Bi dîtina min ew tespîteke raste. Asûrî û Suryaniyên li bakûrê Kurdistanê mane piranî ji vê serdemê ne.

JEDER Û ÇAVKANÎ

1. Tarih içinde Haymana-Halîl Îbrahîm Uçak-1986-Ankara-H. Yardimlaşma Derneği nol.

2. Kürtler ve Kürdistan-V. Minorsky,Th. Bois,D,N.Mac Kenzie-Doz-96-Çev, Kamu ran Firatli

3. VII-Xyy. KÜRTLER-Arşak Poladyan-Oz-Ge-1991-Ankara-Çev.Mehmet Demîr

4. îslamiyete Kadar-Kurdistan Tarihî- Cilt 1 E. Xemgîn

5. Lêkolîn-6. Dr, Cemsit Bender-Înstîtuya Berlin

6. Antîk çağda Kürt Tarîhî-Torî

7. Kürt Tarihî ve Uygarligi-Dr. Cemşît Bender-Kayrvak yayinlari-1991

8. Kürtlerin Tarîhi-Dr, Fritz-Çev. Sinan Şanlier-92-îst.Hasat Yayinlari

9. Dîroka Kurdistan bi kurtebirî-Ekrem Cemîl Paşa-în.K.Brukselü-1995

10. Tarih ve Uygarlik-Anadolu,Kurdistan,Mezöpotamya-Şerefxan Cizirî-Rewşen-1992 Tl. Kürt kokenî Buyuk Boylar-Welatê,Nêrgiza TORÎ-Koral-1991-îstanbûl

12. Kürtler- Sosyolojik ve tarihi Inceleme-Bazîl Nikitin- Cilt-1-2 Deng-1994-îstanbûl

13. Mervanî Kürtlerî Tarîhî-lbn'ul- Ezrak-M.Emîn Bozarslan-Koral-1990-îstanbûl

14. Geçmişten gunum uze-Kürtler ve Kurdistan-Cografya, tarih, edebiyat- K. Burkay- Dengl992

15. Malatya Baliyan Aşîretî-Hasan Nedim Şahhuseyinoxlu-l 991-Istanbû l,

16. Çend Rüpel ji Dîroka Gelé Kurd-Dr.Mezher Ehmed-Elîşer-Stockholm 1991-APEC

17. Doğuda Aşiretler, Kürtler, Alevîler-Bûrhan Kocadax-ANT-1992-îstanbûl

18. Anabasis-Xenephon

19. Kurdistan Tarîhî-M. Emin Zeki-Beybûn-1992

20. Urfa Haçli Kontluğu Tarihî (1098-1118)1. Cilt-Prof.lşin Demirkent-Turk Tarih kurumu Basimcvi-1990 Türk Tarih Kurumu Yayinlari

21. Kürt Gerçegi-olaylar,Oyunlar,Çozûmler-Zekeriya Yildiz-Yeni Asya Yayinlari-1992

22. Kürt Aşiretleri Hakkinda Sosyolojik Tetkikler-Ziya Gokalp-Sosyal Yay.-Hazirlayan, Şevket Beysanoglu.

23. Türklerin Tarihî-Dogan Avcioglu-IV.Kitap-Tekin Yayinlari-1984

24. Türklerin Tarihî-Dogan Avcioglu-V. Kitap-Tekin Yayinlari-1984

25. Erzincan-Ali Kemali(eski vali)-Kaynak Yayinlari îstanbûl -1992

26. XIX: YY: da Osmanli Imp. Kürtler-Dr.Celile Celil-Ozge Yayinlari-Anakara-1992

27. Tarih İçinde Anadolu Sakinleri ve İsyanlar-Ayaklanmalar-Abdulhadi Toplu-Ocak Y.Ankara-1996

28. Osmanli-Rus ve IranSavaşlari'nda Kürtler 1801-1900-Avyarov-ÖsmanlicadarvMuhammed (Hoko) Varli(Xanî)-Sîpan Yavinlari-Ankara -1996

29. Batili Seyahlarin Gözüyle Kürtler ve Kurdistan-I.Şerif Vanly-Avesta-1997

30. Çağdaş Kurdistan Tarîhî-Lucian Rambout-Firat-Dicle Yayinlari-1992-îstanbûl

31. Anadolu Bevlikleri-Prof.îsmaîl Hakki Uzunçarşili-TTKY-Ankara-1988

32. Dîroka Dugelên Kurdan 600-1500 Cilt 1-Abdullah Meme Mehmed{Hoko)Xanî Varli-Sîpan- 1997

33. Yezidilik ve Yezidilerin Kökeni-Erol Sever-Berfin-îstanbûl-1993

34. Kurden Haymana-Ceorges Perrot-Fawaz Husên-2000-apec

35. Anadolu Beylikleri Hakkinda Araştirmalar II, - Prof. Yaşar Yücel, Türk Tarih K.- 1991

36. Xorasan Kimin Yurdu? Faik Bulut- Berfin-1998-îstanbûl

37. Atalarin Karşilaşmasi-Derbend ve Şervan Ülkesinde Kürtler ve Alanlar-Cemal Reşîd Ah¬med-Aves ta-wer ger j i Erebî Siraç Direk 1998, İstanbul.

38. Med imparatorluğu Sonrasinda Kürtler- Tori-Aram yay. 1999-Îstanbûl

39. Kürtlerin Tarihî ve Coğrafyası Elakkinda bir Araştirma-Kazim Yeşîlgoz-1996 Ankara

40. Ali'siz Alevilik-Islam'da Özgürlük Arayisi-l,Faik BULUT-Berfin-îstanbûl-1998

41. Babek- Said Nefisi- Berfin-1998-Istabul

42. Kürt Kültürünün Kaynaklan ve Uygarliklar Beşîgî Kurdistan- J. Kurdo-Özge yayinlari- 1993 Türkçesi:! luri Tuşik Ozkurt

43. Doğu Anadolu Turk Devletleri Tarihî- Prof. Osman Turan-Bogaziçi Yayinlari-4. Baski

44. Genel Kurmay Belgelerinde Kürt Isyanlari 3- Kaynak Yayinlari- 1992

45. Hîvva- Nr 24 -Lêkolînek di rengên ola kurdî ya kevin de- Dilşa Yusif, O.Politika

46. Hurriyet-2. Şubat.2001-Cuma

47. Gürcüler- David Marshall Lang- Ceylan- Nesenur Domanic-1997-Istanbûl

48. Abul-Farac Tarîhî-l-Gregory AbuT-Farac-Ömer Riza Dogrul-1987-2.Baski-Türk Tarih

49. Kürtlerin Kökeni ve G. Anadolu Gercegi-M. Sadi Kocas-1990-Kastas yayinlari

50. Êzidiyatî-Ola Êzidîyan-Xidirê Silêman, Xelîlê Cindî-Avdar-1995

51. Kürtler-Minorsky-Koral yayinlari-îstanbûl, 1992

52. Aleviliğin Kökenindeki Mazda Inanci ve Zerdüşt Ogretisi-E. Xemgin-Berfin-1995

53. Mazda Inancindan Aleviliğe .1. Etem Xemgin- Mezopotamya Yayinlari-2000

54. Eskiçağda Harran-Aynur Ozfirat-Arkeoloji ve Sanat Yayinlari-1994

55. Urartu Kraligi Döneminde Elazig(Alzi)Kemalettin Köroglu-Arkoloji sanat Yay.-1996

56. Yzb. Frederick Burnaby-Kucuk Asya Seyahatnamesi,Anadoluda bir İngiliz Subayi 1876- Sabah Kitaplari 1998-Ceviren Meral Gaspirali

57. Ünlü Kürt Bilgin ve Birinci Kuşak Aydinlar-Mehmet Kemal Işik(Torî)-Sorun yay.-2000

58. Tarihselden Güncele Kürt Gerçexî- Mehmet K.lşikf Torî)-Sorun yy.2000

59. Kürtler ve Kurdistan Tarîhî-1- Botan Amedi-Firat-Dicle yy. 1991-îstanbûl

60. Alevi Kürtler- Erdal Gezik- Kalan Yayinlari

61. Diyabakir- Dr. Ilhan Akbulut- Tukelmat AŞ. 1996-lzmir

62. Çerkeş Tarîhî-Hayri Ersoy-Aysun Kamaci-Tumzamanlar Yayincilik-1994-Istanbûl

63. Kürtler-Kreyenbroek-Sperl-Cep-Belgesel-1994 İstanbul

64. Suryanilerin Kökeni ve Türkiyeli Suryaniler-Yakup Bilge-1991-Istanbûl

65. Kürt Milliyetçiliğinin Tarîhî- Wadie Jwaideh-lletişim Yayinlari-1999-Istanbûl

66. Atlas över mänsklighetens Historia-Bonniers

67. Historia med nya ögon-Anfang Förlag-1996- Stockholm

68. Ninova ve Kalintilari-Austen Henry Layard-Avesta,Çev. Zafer Afşar-2000

69. Bonniers Varldshistoria-1, II Flodrikena- Bonnier-1982

70. National Geographie- Nr; 4 Solens Faraoner -2001

71. Zerdüst-Proto-Kürt bir peygamber-M. Siraç Bilgin, Rewsen-1997-Stockholm

72. Sumer Rahip Devletinden Halk Cumhuriyetine Dogru-Cilt 1-Abdullah Ocalan VVeşanen Serxwebûn 108- Ekim . 2001

73. Böken Om Vikingarna-Catharina Ingelman-Sundberg-Prisma- 1998-Stockholm

74. Svensk-Kurdiska Kontakter Under tusen or- Rohat Alakom-2000-Apec

75. Sumer Rahip Devletinden Demokratik Uygarliga- Cilt 11- Abdullah Ocalan Mezopotamya Yayinlari 108- Ekim . 2001

76. Svarta Havet-Neal Ascherson-Ordfront-Veger: Lars G. Larsson-Stockholm 1999

77. Selahdînê Eyûbî-Cankurd-Helvest-Stockholm, 2000

78. Doğu Anadolu da Aşîret Duzenî-Ahmet Ozer-1990-Boyut

79. Sumerli Ludingirra-Muazzaz İlmîye Çig, 3. Baski Kaynak Yayinlari-2000

80. Hîtîtler ve Hattuşa-Muazzez İlmîye Çig, 2. Baski-Kaynak Yayinlari-2000

81. Îbrahîm Peygamber-Muazzez İlmîye Çig-2. Baski-Kaynak Yayinlari-2000

82. Osmanli Devletî Tarîhî-1 cîlt-Zaman Yayinlari

83. Ma'rûzat-Ahmed Cevdet Paşa-Dr. Yusuf Halaçoxlu-1980

84. Herodot Tarîhî-Herodotos, Remzi Kitabevi, 1991, M. Okmen

85. Adiyaman-însanligin Kultur Mirasi-Mehmet Akar-2000

86. Şahname-Firdevsî-Cîlt I, 1956-îstanbûl

87. Arya Uygarliklarindan Kürtlere, Selahaddin Mihotuli, Koral-1992

88. Padîşah Analari-Alî Kemal Meram, 1997-Ankara

89. Türkistanli Bir Türk Boyu KÜRTLER, Aydin Tanen, T,K.A.Ens.-1983-Ankara

90. Osmanli împaratorlogunda Aşîretlerîn fskani, Cengîz Orhonlu,Eren Yay.

91. Anadolunun îlk Sakînlerî KÜRTLER-Şukru Kaya Seferoglu-T.K.A.Ens. 1982 Ankara

92. Dünden Bugüne Yenice ve Şexbizinlar- E. Yurtdaş, H. Çeker, Faik Coşkun-2003

93. Geçmişten Günümüze Vîranşehîr-Hasan IDÎKÜRT-2000-Mersîn

94. Kürtlerîn îlkçax Tarîhî-Torî, Berfîn yayinlari-2000

95. Handbook Of Iranian Peoples-Rafael Blaga-1997

96. Evliya Çelebi Seyahatnamesi 1-VI Gild, 1944, Reşat E. Koçu-Türk T. Serîsi

97. Kanunî Devri Malatya Tahrîr Defterî (1560)-Doç. R. Yinanç-Doç. M. Elîbuyuk/1983

98. Abbasîler Donemî-Prof.îhsan S. Sirma-1993-îstanbûl

99. Doğu Anadolu Hakkinda Sosya Kültürel bir Arastirma-Doç Mehmet Broz-1972

100. Osmanli-Safevî Döneminde Kurdistan Tarîhî-E. Xcmgîn-Cîlt III-1991

101. Îslamîyetten OsmanlIlara Kadar Kurdistan Tarihî-Cîlt 11- E. Xemgîn,1989-Koln

102. Welatê Me- Faysal Daxli, We şan en Mezopotamya

103. Türkiye deki Tarihsel Adlar- Bilge Umar

104. Dogıt Anadolu da Dil-Onomastik ilişkileri Üzerine bir deneme- Edip Yavuz-1983

105. Abbasîlere Yönelik Dinî ve Siyasî İsyanlar-Cem Zorlu, Ankara Okulu, 2001

106. Cenupta Türkmen Oymaklarİ-I-Alî Riza Yalman, 1977- Ankara-Kûltûr Bakanligi

107. Cenupta Türkmen Oymaklarİ-II-Alî R. Yalman, 1993

108. Aşiretler Raporu-Çok Gîzlî-Kaynak Yayinlari-1998

109. XVI yy da A DI YA M A N-Sosya 1 ve İktisadî Tarîhî-Mehmet Taşdemîr-1999

110. Kara Koyunlular-l-Başlangiçtan Cîhan-Şah a kadar- Prof. Faruk Sumer-1992

111. 387 NoIu Muhasebe: Velayeti Karaman ve Rûm Defterî-I-(1530, Ankara 1996

112. Safevî Dev. Kuruluşu ve Gelişmesinde Anadolu Türklerinin rolü.Prof- F. Sumer

113. Kürt Milan Aşiret Konfederasyonu-Eyup KIRAN-Elma, 2003

114. Ak koy unlu lar-Aşiret, Konfederasyon, împ. J ohn E. Woods, Mîllîyet-1993

115. Anadolu da Türkmen Aşîretlerî-Bozulus-1540-1640-Dr Tufan Gündüz, 1997

116. XIX yy Îkîcî Yarısında Dersim Sancaxi, Doç. Îrahîm Yilmazçelîk-1999 Elazix

117. 387 Nolu Muhasebeî Vilayeti Karaman ve Rûm Defterî- II- (1530), 1997 (Amasya, Çorum, Sivas-Tokat, Kara-hîsarî Şarkî, Canîk, Malatya, Gerger-Kahta...)

118. XVI yy da Çemîşgezek Sancaxi, Prof. M. Alî Ünal, TTK-]999 - Ankara

119. îşte Anadolu-Onıer Tuncer, 1999 îstanbûl

120. Adiyaman Îlî ve ilçeleri, Mustafa Sucu , 1986- 2. Baski

121. SİNCİK, Ekrem Îzî-Malatya 2000

122. Temel Özellikleriyle Kizilbaş Alavîlîk (Talibin El Kitabi) Haşİm KUTLU
123.12 îmam ve Alevîlîk-Cemşîd Bender-Zulfîkar Yayinlari-5. Baski-1977

124. Alevîlik Bîr Sir Dexildir-Alî Haydar Cîlasun-1995

125. Kizilbaşlixin Felsefî Dayanaklari-E. Erip, S. Güven, A. Kılavuz, A. R. Bîlgîlî-Zulfîkar Yavinlari-1997 Köln.

126. Şarktan Her Zaman Güneş Dogmaz-Rohat Alakom-2003-Apec

127. Doğu Îllerî ve Varto Tarîhî-M. Şerif Firat-T.K.A.Enst. 1983 Ankara

128. Doğu Aşiretleri ve Emperyalizm- Dr. Mahmut Rişvanoxlu-T,K. Yayini-1978

129. Kose Paşa Hanedani-Necdet Sakaoxlu-Yurt Yayinlarİ-1984

130. Selçuklu Tarihî (511/1118), Dr. Abdûlkerîm Ozaydin-T.T.K. Yayini-1990

131. Oxuzlar, Prof. Faruk Sumer, T. D. A. Vakfi-1999, Stenbol

132. Çîyayê Kurmênc û Tevgera Murûdan- Roger Lescot- 1993 Swêd

133. Yalan Söyleyen Tarih Utansin-Mustafa Mûftûoglu, IV Cilt-1985

134. Dîvanû Lûgat-ît-Turk Tercûmesî-Cîlt 1-Besîm Atalay-1985- TDKY

135. Dîvanû Lûgat-ît-Turk Tercûmesî-cîlt III- B. Atalay

136. Tarîh-î Cevdet-Ahmet Cevdet Paşa-Cîlt I -Hikmet Neşriyat

137. Diyarbakir Tarîhî-Cild 1- Şevket Beysanoglu-Ankara 1987

138. Diyarbakir Tarîhî-Cild 11-Şevket Beysanoglu-Ankara 1987

139. Bîrnebûn-Hêjmar 26- Lêkolîn-Zorabê Bûdî Aloîan-2005

140. Rewanduz Kürtleri- Edmund R. Leach- Çev: S. Birwan, H. Ozsoy, Ruken Şengul-2001 Aram Yay.

141. Dîyarbakir Evlerî-Orhan Cezmî Tuncer-D.B.B. Yay. 1999

142. Kürtler(îslam Ansîklopedîsî cilt VI sf 1089-1114)-Belge 2, şayi 2-Komela Çanda Gele Kurd li Stockholm-! 982

143. Cîhanbeylî 1987-Alî Fuat Belgîn Endüstri Meslek Lîsesî

144. Bîrnebûn-18- Araştirma-2002

145. Hivva-Mo 131-Heypeyvîn bi Kelîmullah Tewehûdî re-2005

146. Dulkadir Beyligi-Prof. Refet Yinanç, TTK 1989 Ankara

147. Osmanli Devletî-1600-1908, Sîna Aksın, Metîn Kunt-Cem 1990

148. Lîse Tarih 1-Kemal Kara-0nde-2002-03 MEBTTKB

149. Tarih Lise 11-prof. K.Y. Kopraman-MEB-2002

150. Türk Beylîklerî-Osmanli Belgeleri île Kürt Türklerî Tarihî, Na/.mî Sevgen-1982

151. Belge ve Tutanaklariyla Dersim Direnişlerî-M. Kalman

152. Skytema-Herodots/ Suzanne Unge-1979

153. Guldet Fron Steppen-Aron Andersson, Ann Sandwall-Historiska Museum-1979

154. Kürtler-Mehrdad R. İzady-Doz

155. Osmanli lmp. Derbent Teşkîlati-Cengîz Orhonlu-Eren-1990

156. XVIII yy Osmanli Imp. Iskan Sîyasetî ve Aşiretlerin Yerleştirilmesi-Prof. Y. Halaçoglu- 1991

157. Şerefname-Tarîxa Kurdîstanê ya kevn-Şerefxan Bedlîsî-werger: Z. Avci, APEC

158. Bîr Kabile Aîlesînîn Tercûmeî Halî ve Necîp Şahîn in Hatirati

159. Meleklerin Kûllerînden-Andrew Collîns-Avesta, çev: Zafer Avşar

160. Osm. Imp. Oymak,Aşîret ve Cemaatlar-Cevdet Turkay, Tercüman yy-1979

161. Anadolu'da Turk Aşiretleri (966-1200), Ahmet Refîk-1930 İstanbul

162. Osmanli Tarîhî-Il-Ahmet Cevdet Paşa, Hîkmet

163. Osmanli Tarîhî-Ill- Ahmet Cevdet Paşa-Hîkmet yy

164. Koçgîrî Ulusal Kurtuluş Hareketî-Evîn Aydar Çîçek-1999-APEC

165. îç Anadolu Kiirtlerî-Nuh Ateş, Komkar 1992

166. Moltke nîn Turkîyê Mektuplari-Feldmareşal Helmuth Von Moltke-Hayrullah Ors

167. Doğu Anadolu da Göçebe Kürt Aşîretî-Ismaîl Beşîkçî-Yurt 1992

168. Tarih Enstitüsü Dergîsî-13,1. Şahîn, Osmanli Dev. Aşiretlerin Îsîm almalari -1987

169. Tarih Dergîsî-33, 1638 Bağdat Seferinde Zahîre Nakline Memur Edilen Yenî İl ve Halep Türkmenlerî-Îlhan Şahîn 1982

170. Tarih Enstitüsü Dergîsî-12, XVI Asirda HalepTurkmenlerî-Î. Şahîn 1982

171. Orta Anadolu dakî Aşiretlerin îskani, Dr. Abdullah Saydam-1993 Samsun

172. Encvklopaedia Iranica-Ehsan Yarshater-II/5-New York

173. Bîrnebûn-I, Hugo Grothe nîn Seyahatnamesi, Mehmet Bayrak-1997

174. Bîrnebûn-TII-Celikan Aşîretî-Muzaffer Özgür

175. Bîrnebün-IV- Orta Anadolu Ax. Kürt Motiflerî-M. Bayrak-1998

176. Rişvan Aşiretinin Cemaat,Şahis ve Yer Adlari Üzerine bîr değerlendirme- Yrd. Doç. Faruk Soylemez-K.Maraş Sütçü îmam Unîversîtesî

177. Camî'yê Rîsaliyan û h'ikayetan-Cankurd

178. Bîrnebûn-ll-Yunak Kürtleri-Kenan û Muzaffer

179. Bîmebûn-19-Orta Anadolu da îlk Kürt Koyu-Rohat Alakom

180. Bîrnebûn-21-Aşiretler Raporu-Dr Mikaîlî

181. Bîrnebûn-23-Tarîxa eşîra Miakîlîyan li Polatli ye-Dr. Mikaîlî

182. Veger-6-Qoçgirî Bölgesin d ekî Zeriqîler-Yusuf Zerikî-2003

183. Veger-7- Qoçgirî Bölgesindeki Zeriqî Aşiretinin Tarihî ve Kokenî-2004

184. Det Dodsdomda Folkets Saga-M. Anholm-1906 Stockholm

185. M. Bûyûk Iskender-Milliyet-Çevîren: încİAslior

186. Ülkede Gundem-2Ü05.12.22 Prof. Baskin Oran île Roportaj-P. Selek

187. Şehname-Cîld II-Fîrdevsî-Verger Necatı Lugal-1992 İstanbul

188. Aventyr Bland Türkar och Araber- Alexis Kuylenstierna-1912 Stockholm

189. Ozgur Polîtika-5000 yillik şehir bulundu-Tahsin Oruk-22.01.2005

190. Veger-V- Nivîskar: Abd Al Aziz Ömer Hacı Musa-Verger: Dr. Xalid Hamza

191. Afyonkarahisar Yöresi Türkmen Mezar Taşlari-M. Seyirci, A. Topbaş
192. H. Tarîxê Kurden Xorasanê-Cild I, K. Tewahuddî-Meshed
193. H. T. Kurdên Xorasanê-Cild II, K. Tewahodî-Mejhed
194. Ozgur Politika- Zeynep YÜCE- 26, Temmuz. 2002
195. Ê1 û Koçerên îranê, îreç Efşar Sîstanî
196. Ship and Society- Gunilla Larsson-Uppsala Universitet -2007
197. Hereketa Tarîxî ya Kurd li Xorasan-Ûstad Rahnêma Dr. Behrewan.
198. Prisma Världshislöria-Joseph Reither
199. Bazil Nikitin- Kurtler

Qe/lo- wwrov dîhare/ fêh/nv bvh& hw pc^r- çeyehù éZé lu K&rcvya/yva/ îra/vw, pwçeyekv U/ La/fyGjiyê/ w/ pcerçeyeh jû U/ Na/Vendct/ A vw/~ toiê/? Çgiavgl/ cUir& hu/ perçeyeh jù êlê/ xAv&dî/ a-lcu Z&rde^tù, y eh ftewü-Senor, yehşVcu Cu y eh ju S U/YirU/ ye/? £w jv titfoj&âÂyê/ j V d&tOr e/\ şî/we/ şVwl Şttua/ Kurda/ye/. bJa/vê/ pirtùhê/ JyUnXyO' Ş vylo/ KiA/rcUt/tv Irelhû hÂ/v\/ raytir jV bihûya/.

**

DÎROKA KURDÊN KOÇBER 2

Şoreş Reşî

(Anatoliya Navîn, Xorasan, Sûriye, Rûsya)

-II-

Exil och flykting Kurdernas Historia

(Mellersta Anatolien, «horasan, Syrien, Rysland)

Şoreş Reşî

Navnîşan / Adress

Înstîtuya Kurdî li Stockholmê / Kurdiska Institutet i Stockholm Mogârdsvagen 13 143 43 Vârby Gard

Telefon

0046 8 38 81 12

Çapa Yekem / Forsta Upplagan

Tebax 2008 / Augusti 2008

Rûpelsazî

Xalidê Ezîz

Wêneyên bergê

Kesayetiyên Kurd

E-mail

kurdiskainstitutet@yahoo.se

soresresi@hotmail.com

Çapxane / Tryckeri

Berfîn Verlag

Köln

ISBN

91-976138-3-5

978-91-976138-3-5

Înstîtuya Kurdî li Stockholmê & Şoreş Reşî

DÎROKA KÜRDEN KOÇBER

(Anatoliya Navîn, Xorasan, Sûriye, Rûsya)

ŞûREŞ REŞÎ

NAVEROK

Di detna Osmanivan da Kurd û Kurdistan

Di sala 1540 an de êlên Kurd ên li Besni

Elên li Semsûrê

Êlên li Gergerê-Kolikê

Derbend

Beranî (Qerekoyunlû)

Êlên Beraniyan

Pezgewr (Aq Qoyûnî-Bayindiriyê)

Di serdema Osmaniyan de Ferman û Komkujî Bi cîh kirin

Sersor-Alavî-Qizilbaşî (Sûrhûser)

îbatewı-Şu

Êlên mezin ên ku Dewleta Safewî avakirine Ê1 (Eşîret)

Parçên êlên ji hev veqetîne

Êlên Ij Kîxî yê

Êlên li Semsûrê

Kurdên Xorasan û Gîlanê

Bi cîh kirina Kurdan li Xorasanê

Êrî^a dîlekî Kurd a ser Şah Ebbas

Şere Nadir Şahe Efşar bi Kurdên Reşî û Qereçor re

Şere Romiyan û Kurdên Xorasanê

Nîştecîhbûna Kurdên Çemîşgezek/Zaferan li Xorasan

Zeferan (-Lo)/Çemîşgezek

Welatê Eşkaniyan Qoçan (Xebûşan)

Şadiyen Xorasanê

Kurdên Şadî girîngtirîn parêzerên tixubên Iranê ne Gîlan (Reşt)

Bi gişti êlên Kurdên li Xorasanê Nav lê danîna êlên Kurd Celali

Tirkmenên Helebê Boz Ûlus Yenî II

Kaçar (Bayat, Yrva, Şêxbizin-Lek)

Bûyerên demên dereng û giring ên li Anatoliya Navîn Reşî

Şêxbizin (Ler-Lek-Lor)

Canbeg (Bexdilî)

PEŞGOTIN

Xwendevanên hêja!

Di nivîsandina vê pirtûkê de min ji dû kaniyan sud wergirt: Yek, rehmetîyê bavê min Osê Erîf bû; tim digot: "Em ji Xorasanê û ji Xerpetê hatin." Ew gotin bûn destpêka lêgerînên min. Ya duyemîn jî tekoşîna azadîxwaz bû. Vê şoreşe, peşeng û lehengên wê di alî raman de bandoreke mezin li ser min kirin ku di hundirê min de vejînek mezin derket hole. Fw lehengana nebîyana ev pirtûka jî demedi ket, evv şiyarbûn, bîr û bawerîyên mezin jî dernediketin û mümkün e îro em têketena xizmeta dîroka fermî... Ji bo wê spasiya wan herdû aliyan dikim û bejna xwe li ber wan ditewînim.

Ji bo wê jî ev berhemeka cüda ye, di beşa xwe de şoreşeke û bi Perspektivekî nû hatiyê nivîsîn! Hêvîdarim rê li ber niqa§ên nû û dîrokê ji nû ve nivisandinê veke!

Yen ku vê nikaribin tahemûl bikin û xalîçê bin lingan hatî kişandî jî bi awayekî nû erîşan bikin... Bila bizanin ku roj bi heriyê nayê sîwax kirin û êdî Kurd xwedî rabûrdû û peşeroja xwe ne...

Min gelek hewl da ku agahiyan hîn berbiçavtirbikim, lê di vê rew§ê de ji destê min weqes hat. Bê guman kemasî hene, lê di vî warî de gava

yekemîn û ji bo xebatên peş bingeheke. Hêvîdarim ku xort û keç û dîrokzanên Kurd wê hîn pêfdatir û nûjêntir bikin. Yekê jî ev karê zanko, înstîtû û komên pisporanan e. Ji bo kesekî derfetên xwe bi sînor re karekî giran e.

Ji bo ku Kurd bê dewlet in, heta niha li ser dîroka wan lêkolînên zanistiyê hatine kirin kêm in. Miletên serdest jî vê yekê firsend dihesibînin û li ser kelepûra me ya dîrokî rûdinên û dibêjin ya me ye... Hatina wan a Kurdistanê hîn hezar sal nebiyê, lê xwedî li dîroka deh hezar sa! û Sûmer, Hatî, Oxûz û Turkman derdikeve û dike male xwe...

Her ku ev lêkolîn kûr bû û min parçêbûn û trajêdiya Kurdan dît, kêfa min herimî, Kurd di pevajoyekî dîrokî gelek bi zahmet û dirêj re derbas bûne. Her ku mirov <3ikeve nav, fêr dibe, yan giriyên mirov tê yan jî mirov bi hêrs dikeve: ku çawa heta roja îro ew wiha girtî û berovajo hatiye zanîn û nivîsîn. Birastî mirov gelek şaşmayî dimine ku ew xelka mecbûr bûyê serokên xwe yen serhildan kirî teslîmî nijatperestên misilman bike û pê canê xwe rizgar bike!... Gelek caran bira li hember bira derxistine û rûhiyeta wî gelî xirav kirine...

Gelo mirov dikare fêhm bike ku parçeyekî êlê li Xorasana îranê, parçeyekî li Lazqîyê û parçeyek jî li Navênda Anatole? Çawa dibe ku perçeyek ji êlê xwedî ola Zerdeştî, yek Eîewî-Sersor, yek Şîa û yek jî Sünnî ye? Ew ji lirajediyê jî zêdetir e; şîne şîn! Şîna Kurda ye. Navê pirtûkê bibûya Şîna Kurdan belki hin rastir jî bibûya.

Ji vê parçebûnê re hêza min têrê nekir. Min nikarî herim her cîh û parçeyekî. Gelek sedemên vvê hene: Maddî, dem, tirs, berpirsiyartiya bav bûnê û hwd... Min kari tenê du caran herim Xorasanê. Careka din jî pêwîst bû lê min nikarî. Carekê çûm Gîlanê. Bi tavbetîji bo çûna minê Xorasan gelek kesan got: "Mere! Dewletê te bikuje!" lê min got bizanim, ku ewê min bavêne paşiya wesayitan û heta vir bi erdê re kaşkine, êvaran

di nav maran de rakevime û dê min bikujine jî ezê herim. Di serê min de tenê va lêkolîna temam kirin hebû û min çend caran ji xanima xwe re got: Eger ez wê temam nekim bimirim, çavên min ê vekirî herin! Bi rastî jî ez di gorê de rihet ne radizam û çavên min ê li paş bimana. Li Bakûrê Kurdistanê gor îmkanan li herêmên Kolik, Meletî û Semsûrê hinek lêkolîn di cîh de kirin. Li beşekî mezin ên gundên Anatoliya Navîn geriyam û ji kalan sûd wergirtim. Bi zor û zahmetivan pirtûk dame tercüme kirin.

Di dîroka Kurd û Kurdistanê ya dirêj de tenê ew pêkelokêke û heta pirtûkên ji vê baştir, berfirehtir û kûrtir derkevin ew ya gaveka li pê§ e. Beştebûna wê di îdeayên nû de ye: Heta îro digotin ku nivîsa kevirên Elegeşe ya Tirkan e! Heta ji destên min hat min li ber çavan raxist ku ew qala Kurdan dike...Dibêjin: Oxuz kalên Tirkan in... Lê min hewl da ku îspat bikim ew Kurdên li dervayî Welat in...Ji bo Saka, Îskît, Peçenek, Alan û yen din heta roja îro ew bi miletên din re girêdidan... Lê ew kalên Kurdên îro li dervayî Welat in...Her wekî din digotin: Xorasan warê Tirkan e; cara yekemîn Tirkan Anatol servegirtin; Germîyan, Qereman, Beranî û Pezgewr Tirk in û hwd gelek îdea yên bi vî rengî hene. Ev pirtûka di dest we de dîrokên li ser derawan hatî nivîsandin dihejîne û hewl dide ku vê yekê îspat bike. Di nivîsandinê de bi serketim an na ez nizanim. Eger bi ser neketibe kêmasiya min e. Lewra li ber min zahmetiya ziman jî hebû.

Li dij her astengîyên derketin peş min va pirtûka bi zimanê xwe kurdî nivîsand. Ev bi serê xwe serhildana hezar salan a li dijî dagirkeran e... Belê ew em kuştin, koçber kirin, xwestin asîmîle bikin, lê biser neketin; ev jî bersiveka hezar salan e û parçeyek ji berxwedana Kurdên Koçber e... Min xwest pirtûkxana Kurd pirtûkeka nû qezenc bike; xortên Kurd dîroka xwe bizanin û serê wan bilinci bibe. Beri her tiştî Kurd bigihêjin zanyariyeka gîştî û hevûdû baştir fêhm bikin; paşê jî min xwest bibim bersiva dagirkeran û penûsên dîrok berovejo kirine...

Miletê cîranê me Rûsan edeteka xwe heye: Keç û xortên xwe dema dizewicînin, çîrokên xwe yên klasîk diyarî dikin ku ew jî ji zarokên xwe re bixwînin. Ez jî vê pirtûkê ji Kürden Koçber peşniyaz dikim ku diyarî keç û xortên xwe bikin û ma ew jî ji zarokên xwe re bixwînin...

Her mijara di vê pirtûke de dikare bibe têza doktoran a zanîngehan. Hêvîdarim xwandavanên Kurd vî karî bikin. Piştî vê, Zanko û Instîtûyên Kurd çend komîsyonan avabikin û herin Afganistan, Hindistan, Xorasan, Gîlan, Qefqasya, rojavayê Kurdistan, Anatoliya Navîn, rojavayê başûre Kurdistan û Lazqîyê û nîştecîhen Kurd di cîh de iêkoiîn bikin. Di warê dîrok, ziman, kinc, ol û jiyana civakî de bikolin û rûnin dîsa vê pirtûkê binivîsîrün.

Ev pirtûk ji du cîldan pêk tê. Di cîlda yekem de, piranî dîroka Kurdan ya gîştî heye û di nava wê de jî dîroka Kurdên Koçber en kevn heye. Yanî kaniya herdûyan jî digihîje hev û min xwest ew kaniyana destnîşan bikim. Di vê beşe ango cîlda duyem de jî: Di serdema Osmaniyan de rewşa Kurdan destpê dike. Komkujiyên Osmaniyan, Dewleta Safewî-Şû, Bi cîh kirina Kurdan li Xorasanê, Gîlan, Celalî, Reşî, Şexbizin, Canbeg, Mikaîlî, Sewêdî, Celikî, Zerikî û dîroka êlên din heye.

Di xwendina pirtûkê de li dawiya hevokan hejmara hatiye nivîsîn jeder û rûpela wê dide xûyakirin. Weke mînak (126"'40) dide nîşandayîn ku jêdera bi hejmara 126 an û rûpelê wê ya 40 an e.

Di amedekarîya vê pirtûkê de li Xorasanê geiek alîkariya Apê Hecî Barûyî bû; dîsa Mam Hesen Nozhatzade di alî tercûma farisî de alîkarîya min kir. Di alî redekte kirin û dîzayine de jî hevalê hêja birêz Xalidê Ezîz fedakariyên mezin kirin û spasiya hersêyan jî dikim.

Şoreş Reşî Stockholm 15. Tebax. 2008

DI DEMA OSMANIYAN DE KURD Û KURDISTAN

Heta vir gelek caran min nivîsî ku Kurdên li navenda Xorasanê ji ber Tirk, Moxo! û Tîmûr gelek caran cîh guhartin û gelek ji komên Kurd hatin li Anadole mirîtî avakiribûn. F. Sumer li ser damezirandina Osmaniyan wiha dibêje: Osman Beg û lawê wî Soxût-Bûrsa heyna, ji Enqerê hatibû Soxûtê û ew jî begekîTirkmen bû. (131182) Tirkmenbûna wî ji bo me girînge û wekî min nivîsî di Ti rkmen de mebesta wî Kurdên li dervayê welat in. Yekê jî ew ji Enqerê çûne. Wê demê Enqere bi piranî di destê Kurdan de yê. Yanê piştî vekişîna Bizans êdî Kurd xwediyê vî bajarî ne, di beşen derbasbûyî de min nivîsîbû. Hema hema ji sedî sed ez bawerim ku ew Kurd bû. Jixwe gelek dîroknûs jî li ser Tirkbûyîna wan, di şike de ne. Bi berdewamî hema nûser dibêje: Ew ji ber Moxolan ji dora Merv/Mehanê hatin Enqerê û ji wir jî ji ber Moxolan çûn Soxûtê?13,182) Bi ditina min ne ji ber Moxolan, ji ber Tirkan hatin Enqerê. ji ber Moxolan jî çûn Bûrsa-Soxûtê û îhtîmaleka pir mezine ku ew ji koma Germiyanî ne.

Di gelek jêderan de tê gotin ku koka Osman Begê ku dewleta Osmanî avakiriye, ne diyar e. Dîrokzanê Osmanî bi piranî wî girêdayî Oxûzan û êla K/Qayî dikin. Oxûz jî bi piranî êlên Kurdên ku ji Xorasan, Derya Kesk, Mancik û Seyhanê hatine. Elî Kemal Meram jî diyaloga navbera Osman Beg û xanima wî ya bi navê Bala wiha radigihîne, Osman:

-Ere ez misilman im, lê tu dizanî ez ji kîjan miletî me?

-Ez û êla min ji koka Persan tên!

-Fers? Ew kîjan milet in?

-Jê re Ecem jî tê gotin.

Mirov dikare vê wek Kurd bixwîne; lewra di lîteratûra Tirkan de heta dema dawî Kurd tunebûn. Lê Yûnanî bûyîna wî balkeşe. Gelo ew ji Kurdên xwe avêtibûn paş Bîzansiyan bû an jî ewên ku dînê xwe guhartine? Ew bê

guman zêde lêkolînê dixwaze. Dîsa di heman pirtûkê de Osman Bey ji kurê xwe Orhan re wesiyet dike û dibêje:

-Bi Bizans ve navbera xwe xera meke, ew bi hêz in. Çavê xwe ji ser Tirkan hilnede, navbera wan tim xera bike, ew dijminên me yên herî mezin in ins so orhan hat ser text şıında hereketê xwe û zimanê xwe jî hat guhartin?88'361 Ew jî niqteyeka gelek girînge ku ew çawa bû, ku wî zimanê xwe guhart? Tistê bandor li ser wî kire yan jî zor da wî çibû, ku ew bi temamî hate guhartin?

Me gotibû, ku dema Kurd ji navenda Xorasanê hatin Anadolê gelek mîrîtî ava kirin; agahiyên li ser wan piraniyê di arşîven Tirkan de ne û gor dilê xwe jî dîrok nivîsîne. Hinek ji wan xelekên baU^ş radigînin: Dema li Anatoliyê mîrîtiyên cûr be cûr derketin holê, di nava wan de yek hebû ku bala ti kesî nedikişand û li ser wê ti agahiyên zêde jî tunin li destpêkê. Gor jêderên Bizansan Osman Bey girêdayî begê li Qastamonûyê bûye. (82) Ew jî ji Şadiyan

veqetîbûn û hatibûn dora Qastamanûyê. Heta me got îhtîmaleke mezine ku ew Kurdên Lêr-Şêxbizin bin jî. Navê vvan ê din jî Şivankar e ku tê wata şivane karan. Ne dûr e ku kesê dewleta Osmanî ava kirin Kurdekî ji koma Lek-Lor- Şexbizina ye! Tê gotin ku Osman Beg girêdayî eşîreta Qayî ye. Lê êl bi navê wî tê xwendin; ne bi navê bave Osman Ertugrul yan jî bavê wî Gunduz.<82) Di vir de jî xuya dike ku ew ne Tirke...Osman Beg di navbera Eskîşehîr, Bûrsa û Iznîkê de bû, li destpêkê ew bi Bizansan re nekete tekoşîneka dijwar û bi wan re bi rindî debar kir. Xwe bi hêz kir, paşe jî bi navê dîn û cîhadê derkete holê û bi vê riyê desteka Tirkmenan jî wergirt. Di sala 1302 an de hêzeka Bîzansan têk bir û bû serokê manewî yê dora xwe û yê Tirkmenan. (82) Diyare, ku wî piştgiriya misilmanan jî wergirtiye û mumkune ku ol bû sedem wî xwe guhart û netewa xwe veşart. Yanî, wrekî Selheddîn Eyûbî ola misilmantî derxiste pâş netewa xwe.

Halaçoglû jî dibêje: Dewleta Osmanî di dema avabûnê de, êlên koçber, li cîhên ku nû dagirkiribûn bi cîh dikirin ku wan deran bike axa Tirkan.<156 3) Dema dewleta Osmanî ava bû, mîrîtiyên din jî li Anadolê ava bûbûn. Ji ber wê ew dîtin heta niqteyekê ne di cîh de ye. Lewra ew Osmaniyan dike navenda dîrokê; di ber hatina Anadolê gotinên bi vî rengî hebûn, rêvebirên Selçûqî soz dan Kurdan ku cîhên dagirkiribûn ewê ji wran re bimînin, lê soza xwe zû jibîr kirin. Osmanî bi hêz bûn bi şûnde yek û yek mîrîtiyên Kurdan ji holê rakirin. Hîn Osmaniyan xwe bi rêxistin nekiribûn ku êlên Kurdan tevahiya rojavayê Anadolê dagir kiribûn. Raste, ew êlana gor gelên nişteçîh hîna şervan bûn, hîn bi disîplîn û di nava tevgereke de bûn ku ew taybetmendiyên wan ji bo cîhên nû pozîtîf bûn. Lê ne ku Osmaniyan dagir dikir û teslîmî wan dikir bû.

Benê wan salan Şahabeddîn el-Omerî (...?..-1348) di pirtûka xwe ya bi navê "Masalîk el-Abşar" de lîsteya beşekî ji Kurdan dide. Gor wî li Iraq, el-Diyar el-Arab, Sûriye û li Yemenê Kurd dijîn. Welatê çiyayî ku Kurd lê dijîne (el-cibal) ji Elemedan destpê dike heta Kîlîkya yê. Omerî, ji Cizîrê heta Hemedanê van êlan dijmêre:

Geranî: Li Qirsehîrê êl û gundekî Hecibayî bi navî heye.

Gilalî: Beşek je çûn Sûriyê (bi dîtina min ew nav piştre veguhurî Celaliyan) Zangalî (Zengine?): Dibe ku Zengene bin

Kûsa û Mabir: Ji Şehrîzor koçî Sûriyê û Misir kirin. Dibê ku Koşa bin jî. Sabûlî (Sûtûnî?): Li Şehrîzor û Uşnû dijîn.

Hasnanî (Xoşnavî?): Karkar û Darbendî-Qerebolî dijîn.

Karhîn (=Kirkûk?): Daqûqê dijîn. Eleka nêzîkî Hewlêrê.

Mazancan û Humaydî: Hewlêr.

Sohrî (Soran): Telî Haftûn.

Zarzarî (kurên zerîn): Cîranên Sohriyan bûn û li Melazgir (=Rubar-î Barazgird) û Rûstak (başûre Şemzînan) rûdiniştin. Îhtîmaleke ku Zarzarî, Kurdên Zeri kî bin.

Colemêrg

Markawan

Navça Gever: Nêzîkî Colemêrg

Navça Zibari: Li kelêka Akr-Amadiye û nêzîkî Colemêrg

Hekarî: Amadiye

Besîtkî: Hekarî

Bohtî: Colemêrg û Mûsil

Dasinî: Çûn welatên bi heyî û 1000 li Mûsik 500 ji li Akrê man.

Dinbilî: Li çiyayê bilind dijîn. Ew Kurd bi piranî nişteçîh in. Ew nivîskar qala Kurdên koçber yan jî yen li rojava nake. Di piraniya jêderan de şopa wan nine. Sedema vê jî cîh guhartina wan ya herdemî bû. Ji bo wê jî em vê kelkê dikarin tenê ji jêderên Tirkan sud werbigirin; lê di jêderên wan de jî li ser avabûna Osmaniyan zelalî nîne. Yek jî mirov eşkere dibîne ku ew nivîskarana tiştekî ku ne yen wan bûne xwestine bikin male xwe. Bi gotineka din; wan dîroka nîjadê xwe li ser nijada Kurd avakirine.

Cengîz Orhonlû dibêje: Di destpêka avabûna Osmaniyan de, êl, ji bo Tirkbûna welatên nû hatibûn dagirkirin rolêke sereke diliştin û ji bo vê jî bi kar dihatin. Ji bo wê belgeya yekemin di sala 1357 an de hatiye tanzîm kirin. Di dema Mûratê I an de, di sala 1385 an de h inek êl ji Sarûhanê derbasî Serez hatin kirin. Di dema Beyazîd de jî (1401), ji deşta Menemen hinek êl (Goçerewlîler) derbasî Rûmelî-Fîlîbe kirin. (9D'102/3) Wê demê Osmanî xwe bi hêz dikin û bi taybet jî Beyazît, ku zavê Kurdan bû, gelek zirar da Kurdan. Ew Kurdên ku çûbûn Balkanan vegerîn an na, kes nizane.

Bawer dikim ew li wir heliyan. Eger mirov li Tirkên Bûlxarû yen din binêre li rûyên wan şopa Kurdan heye, lê dibêjin em Tirk in. Kî dizane ew ne Kurd in?

Ji avabûna dewleta Osmanî bi şûnde, ew hêdî hêdî xwe bi rêxistin kirin û bi piştgiriya ol yan jî di bin ala cîhadê de erîşî Bîzans, Sirb û mîrîtiyên Kurdên li rojavayê Anadolê kirin. Car cama jî ji bo ku erişe Kurdan bikin bi Makedonî, Sirb û yen din re hevkarî kirin. Cama jî bi riya zevvacê û bi peran kirînê xaka Kurdan tevlî dewleta xwe kirin. Me ji bo wê agahî di beşûn derbasbûyî de dan. Pişti tevgera Tîmûr jî êdî li hember Osmaniyan; hezên Kurd, Ecem û Ereb man. Kurdên ji Anadolê û ji ber zilma Osmaniyan reviyabûn jî dîsa vegeriyan Arran, Gîlan, Iran, Xorasan û cîhên din. Di avabûna Sefawiyan de jî rola Kurdan berbi çav e; berî vê, Kurdan bi rêxistinên mîna Beranî û Pezgewran jî hewl dan, lê mayinde nebûn. Emê li pûş qala wan jî bikin.

Di serdema Osmaniyan de, şeren di navbera Safewî û Osmaniyan de careka din hestiyê pişta Kurdan şikand. Lewra: şer li ser welatê wan bû û Kurd ji alî olî ve bûbûn dû beş, careka din li hember hev şer kirin û qira hev anîn. Kurdan, li hember misilmantî û erişen Osmaniyan xwe wek muxalefet li dora Şûx Îsmaîlê Safewî bi rêxistin kirin. Bixêz M. Wekîlev di pirtûka xwe ya bi zimanê Rûsî nivîsî de îddea dike, ku ew navê Safewî ji êla Kurdên bi navê Sêvika hatiye. Mîrekî Dulqadiran yê bi vî navî jî hebû û yek ji wan komana bû ku di damezirandina Sefawiyan de cîh girtibû. Heta Şah Îsmaîi ji alî

pîreka Dulqadirî ve hatibû parastin û veşartin. İsmail, hêza xwe li destpêkê li bakûrê Kurdistanê kom serhev kir. Piştre erîşî Gurcîstanê kir û ew dewleta kire bin desthilatdariya xwe. Paşe İİ dijî Pezgewran şer kir (1500). Şah İsmail paşe şûti kire ola fermî ya Iran û Kurdistanê. Piraniya Kürden nişteçîh sûnnî bûn, mîrîtiya Senendej û Kirmanşahe ji Kurdan

stend. Wî baweriya xwe bi Tirkmenan-Kurdên koçber û bi Şia tanı û li dijî Kürden sûnnî bê wijdan bû. Ji bo vê jî bû sedema rûxandina nêzîkî 50 mîrîtiyên Kurdistanê ku bûn dîlên Tirkan. Şah İsmail di azanê de guhartin kir û şûna Muhammed "eşhedû enne Eliyen Welîûllah" da xwendinê. Ji alî din ve jî, li dijî Osmaniyan şerekî dijwar ê mezhebî dest pêkir. Ji bo vê jî, bi veşartî gelek kes şandin Anatoliyê û bakûrê Kurdistanê ku propaganda wî bikin û ji xwe re alîgiran peyda bike. (58) Di encama vê propagandayê de bû, ku gelek êlên li bakûrê Kurdistanê yen mîna Reşivan û yen din, hêstên xwe yen olî dîsa bilind bûn. Ji bo vê jî li gelek deveran "cem" dikirin û ji bo Şah xêrê belav dikirine ku li ser wan gelek fermanên Osmaniyan hene. Seyidê Dêrsîmê, di navbera sedsala XIII û XVI an de mîna derweşen Tlrkmenên li Antoliya Navîn û rojava digeriyan û gelek ji wana jî ji Xorasan hatibû n.<60)

Şah Îsmaîl, bi alîkariya Kurd û Elewiyên li Anadolê: di sala 1500 an de Ezerbeycan; di sala 1507 an de jî Amed heyna. (58) Bi taybetî jî yek şand Anatolê ku navê xwe Nûr Elî Baba bû û ew li nav mîrîtiya Çemîşgezeka Şûx Hesen de bi cîh bû. Çemîşgezeke, di dîroka Kurdan de hertim rîhekî girîng girtiye û ji mîrîtiyên mezin yek bûye. Vê demê sencax-mîrîtiyên bi navê Mîremîran yên Kurdan yê mezin; Cizîr, Betlîs, Soran, Heskîf, îmadiye û yek jî Çemişgezek e. Herêma Dêrsîm hetanî Tercanê di destê Begliga Şêx Hesen de bû. Şerefxan dibêje: Dema Kurdistan dihate gotin, mîrîtiya Çemişgezek dihat bîra gel. Ji ber sedema hêzkirina ji ola Şah, deriyê mîrîtiyê hemû ji Nûr Elî re vekirin. Lê dema begê Çemişgezeke çû cem Şah ew girtin û şandin başûre Kurdistanê. Paşe gel serhildan kir û H. Ristem xwestin. Ristem hate bakûr û keleha Kemahê li hember Yawûz parast; Yawûz ji malbata wî 40 kes kuştin. Şûna wî kurê xwe Huseyn derbas bû û êl gîhandin hevdû û li dijî Sefawiyan şer kir. Mîrîtiya Pîr Huseyn pa§ê bi eyelata Amedê re hate giredan.

Berî ku şen? di navbera Osmaniyan û Sefawiyan yê li Çaldiranê di sala 1514 an de pêk hatî; Selîm, Kurdên Elewî yên ku tespît kiribûn d i şur re derbas kirin. Tê gotin ku di wan komkujiyan de 40hezar Kurdên sersor hatibûn kuştin. Bajarên mîna Mêrdîn, Riha, Heskîf, Rakka ji destê Iraniyan hatin girtin û Kurdên Şîa yên alîgirên îranê dihatin kuştin.l59) Evên ku ji ber reviyabûn jî li çiya belav bûn. Ji wana êla Dêrsîm Hiran û Izol ji Pertekê çûn Melazgirê. Êla Sadie (Şadı) jî li Mazgirt, Palû, Kîxiyê bi cîh bû; êla Koçgirî li Zara; Kumsoran li Kizilkilîse (Nazimiyê), beşek jî bi êla Homecik ve li deşta Tercan û hinek jî İl Sêwas, Dîvrîxiyê bi cîh bûn. Ela Balaban jî li Pulumur û Çemê Balaban bi cîh bûn. (39) Osmaniyan di şere Sefawiyan de, ji bo ku Kurdan bikişînin aliyê xwe Timar dan wana. Bi wî şiklî Kurdan baca ku ji gel kom dikirin beşek jê ji xwe re hiltanîn. Ji heft timarên Kurdan dido jê girêdayî êla Berazî û Asiyan bûn. (58)

Bi hatina Nûr Eli Baba re Osmaniyan ew şopandin û ji şere Çaldiranê şunde, îhtîmalek mezine ku sala 1515 an be, lewra he ta sala 1514 an e w mîrîtî serbixwe û azad e. Di nava herdu aliyan de şer derket û Nûr Eli di şer de mir. Di vê navberê de Hecî Ristem jî mir û Pîr Huseyn bi davetekê hat li ser texte Çemişkegeke rûnişt. Bi mirina Hecî Ristem re Keleha Kemahê derbasî Osmaniyan bû û garnîzonek li wir ava kirin. Begê (Alaeddevle) Dulqadiran ku nikaribû li Xarpûtê bimîne vekişiya Elbîstanê. Alaeddevle xezîna xwe û malbata xwe şand serê çiya fi bi xwe jî bi Osmaniyan re kete şer. Çar kur û birayên wî dît ketin destê Osmaniyan. Serê wan jê kirin û ji siltanê Memlûkan re şandin. Bi vî awayî Yawûz dixwest beg û mîrîtiyên Kurd, bi taybetî jî yen bi Şah re di îttîfaqê de û yen ku di mezhebe Şîa de ne ji holê rake. Li alî Ezingan û Sêwasê jî Xalit Begê Kurd hebû û gotina wî li herêmê derbas dibû, ew jî wekî yen din ji holê rakir. Wê demê hevkariya êlên niha li Anadolê û Kurdên Dimilî û Elewî heye. Sedemên vê gelek in: Di serî de sedemen olî-mezhebi, netewî

û azadî xwestin û xwedîbûna heman pêvajoya dîrokî hebûn. Ji ber ku Keleha Kemahê di destê Reşiyan de bû û mîrîtiya Çemişkegeke jî di destê piraniya Kurdên dimilî de bû. Bi serokê Dêrsîmiyan re Kalmam-î Sir dihate gotin; îhtîmalek ku ev serokê olî be. Mîrîtiya Şex Hesen ku ji Yawûz derbe xwar bi şunde ji Meletiyê (Kalmam- Sir ê) dev berda û li herêma Lertika Ovacikê bi cîh bû û bû du beş. Êlên di wan beşan de jî wiha xuya dikin:

Sevid Sêx Hesen

Herêma Ovacik-Ezingan Herêma Hozat-Çemişkegek

1. Koç (Beran) 1. Qerebalî
2. Kalo 2. Ebbasan (Seyît Riza ji vê ye)
3. Reşo (Reşî) 3. Kirganlar
4. Feratanlar (Kurmanc)

Li Xorasanê jî êleka bi navê Seyidan heye û beşek ji wan hîna jî koçber in û li dora çiya yen Hezarmecîd de dijîn û Kurmanc in. Mirovên kej û çav şîn in.

Bûyina Beraniyan balkeşe, ku bi tirkî dibêjin Qerekoyûnî. Reşî jî li her cîhî hene. Dema mirov li vê tabloyê dinêre vekirî xuyadike; ku yen di bin sî-wana Beranivan de kom bûne Kurdên Sersor in.

Erdal Gezik jî dibêje: Konfederasyona Şex Hesen dibe du beş:

Seydanî Sêx Hesenî

Gewû Qerebalû

Dem-Asur Ebbasû

Qozû (Kdçan) Kirganû

a. Qozû Ferhadan

b. Şemkû Zenganû

c. Nenkû Laçinû

d. Reşkû Findanû. (60)

Seyîdiyên koçber yen li Xorasanê

Ji vê tabloyê jî tişte ku em derdexin ev e; ku êla Zenganû ya ku navê xwe derbas dibe îhtîmaleka pir mezine ku kalen Şexbizinen li Haymanê û cîhên din bin. Laçînû jî balkeşe; lewra li Xorasanê Laînî hene û dibe ku kalen wan bin. Elên Dersim jî gelek in, hinek ji wan ev in: Bilikan, Bûtkan, Canbegan,

Rûtan, Şadan, Şakaka, Şex Bazan evên li dervayê Dersime jî Atma û

Balyan in. (60) Di dema Yawûz. de, êlên mîna Çarikli, Lolan, Şadî, Arslan Uşaxi û Balaban li Dersime bi cîh bûn. (l16',27)

Ew êlên hatin hejmartin hema hema bi temamî îro li Anatoliya Navîn û Xorasanê dijîn. Em dikarin bi hêsanî bibêjin; ku beşek ji wan elana di dema Yawûz de li Dêrsîmê bûne. Lewra hinek ji wan xwedî gelek serhejmar in û dibe ku li herêmên din en çiyayî jî hebin. Yeşîlgoz dibêje: Di demê berê de hatibûn vira. Zivistanan diçûn Xarpût, Meletî, Arapgîr û bi taybetî jî herêma Qereyazi, Nazarûşaxi. Mîrîtiya wan du beş bûn: Dêrsîma Rojava û ya Rojhilat. Şâx Hesen keça xwe (Kincê Sor) dide Dêrsîmiyên rojhilat û vê herêmê ji zavê xwe re dihêle. Mirov dikare bêje îttîfaq û ev xisimatiyê jî bi hêz kirine. Di sala 1541 an de Kanûnî Silêman ji bo Çemişkegek kanûneka taybetî derxist û navê vê jî "Çemişkegek Sencaxi Kanûn-namesî" bû ku ji 300 pezî miyek yan jî 30 akçe bac dihate stendin. (39) Li Xorasanê konfederasyona Çemîçgezekê heye;

hîna jî bi wî navî tê xwendin. El û fedarsyonên di nava wan de, bi tabloya jor ve hema hema yek e. Xuyaye ku ew jihev veneqetîne û bihev re jî çûne Xorasanê. Di beşa Xorasanê de emê qala wan bikin. Ji vê şunde beşekî Koçanı li Sariza girêdayî Qeyserî, beşek jî Qoçgiriya Sêwasê bi cîh bûn û

beşek jî li Hozat û Çemîşgezeke nîv koçber mann,i Ew navê Koçan ji Beraniyan tê; ew jî dide îspatkirin, ku ew Kürdana hîna jî di baweriya Elewî-Sersoriyê de ne ku Qerekoyûniyan pê bawer dikir.

Me gotibû ku wê demê li Kurdistanê gelek mîrîtiyên Kurdan hebûn; le ew di navbera çakûç û kelpetanê de bê çare mabûn. Eger wê demê yekîtiyek xurt a serbixwe avabikirina, îro rewşeka din li holê dibû lê mixabin! Yekîtiya pêk hatî jî, li ser berjewendiyên Osmaniyan bû, ku Idrisî Bedlîsî vê yekê bi alîkariya Yawûz pêk tîne. Bedlîsî, 25 begên (Hikumet) Kurd bi xwe re girêdan û girêdayî Amedê jî 10 Hikumet hebûn, vana: ... Heskîf, Mehmûdî ye (Li rojhilatê Wanê bû ji 120 êlan pêk dihat). (59) Merdas, Sûweydî, bûn. (39)

Wek tê zanîn, êlên di nava Hikumetên li jorê me nivîsî niha li Anatoliya N'avîn û cîhên din belav bûne. Hîna jî Mirdêsî û Sewêdî li navenda Anadolê ne. Federasyona mîna Reşiyan jî dem bi dem di nava Heskîf û Mehmûdiyan de mane. Dema Osmaniyan erîşî Iran kirin, roj hate girtin û ew yeka di nava Osmaniyan de bû sedema kêfxweçiyê. Sedema vê jî ev bû, ku digotin: Kurdên di baweriya Zerdeştî de ne, dê vê yekê morala wan xirav bike. (31)) Ew bûyera jî dide xuyakirin, ku êlên li dervayê Welat (Sersor) heta vê demê li ser ola xwe ya kevn in. Ew yeka ji fermanên piştî vê demê jî tê îspatkirin. Di vî şerî de bi alikariya Kurdan, Osmaniyan Şah têk birin.

Şere Osmanî û Sefawiyan yê di sala 1514 an de li Çaldiranê pêk hatî şûnde, mîr û begên Kurdan xwestin xwe bi Osmaniyan re girêbidin. Şah İsmail jî li hember vê tedbîr stendin. Birayê Ustaclû, Xanê ku di şere Çaldiranê de mir Qere Xan şand cem desthilatdarê Riha Dûrmiş Beg û wana tevûhev Amed dîsa dorpêç kirin, ku ji destê Osmaniyan derxin. Di heman demê de ji hêzên Sefawiyên li Merdîn, Heskîf û Erxaniyê re jî ferman şand ku piştgiriya Qere Xan bikin û tevhev 5000 hezar leşkeran

salekê Amed dorpêç kirin, lê encamek bi dest nexistin. Bi hatina Biyikli Mehmet Paşa yê Amedê re Safewî reviyan Merdînê. ((,1) Dema Osmaniyan bi Sefawiyan ve li Mêrdînê şer kirin, artê§a Osmanî ji alî Biyikli Mehmed Paşa (ew jî Kurd e) û Idrisî Bedlîsî ve dihate birêvebirin û li milê çepê arteşe jî, desthilatdarê Çemişgezek Pîr Huseyn Bey, desthilatdarê Arapgir û gelek begên Dulqadi riyan hebûn. Aliyê Sefawiyan jî alî Qere Xan (tê gotin ku ew jî Kurd e) ve dihate birêvebirin, lê Qere Xan têk çû, Bi vî awayî Kurd bi destên Kurdan dihatin kuştin û gelên din jî Imparatoriya xwe li ser xwm& wan avadikirin.

Beri şere Çaldiranê mîrên Kurdan tevgera Sefawiyan tim rapor dikirin û ji Osmaniyan re dişandin. Ji wan raporana di yekê de Xanê Bedlîsê Şerefxan ji Biyikli Mehmet re name dişine û li ser Şah van agahiyan dide: Di yeka ji sala 1513-14 an de wiha dibêje: Şah li Meraga ye. Birayê Ûstaclû Şah Mule li

Xorasan û Amedê Ûstaclû Memet Beg ji Esterabadê bi 5000 esker hate cem Şah û niha jî sîleh û malzeme kom dike. (l50_28)

Pişti gelek amadekariyan, di şer de Safewî têk çûn. Rola sereke jî waliyê Amedê yê bi navê Ûstaclû Muhammed Xanê Safewî dilîst, lê ew di şer de mir (138-492) y ser nijada wî N. Sevgen dibêje: Emir Şeref ji alî Şah ve hate girtin bi şûnde, Bedlîs teslimi Ûstaclû Şerefli Kurt Beg kirin. (150 210) Ûstaclû ji Kurd e; vê yekê em di nameyên Biyikli Paşa û Yawûz de derdixin ku giredaneka balkâş jî derdikeve holê!

Piştî şerû Sefawiyan û Osmaniyan (1516) Biyikli Mehmet Paşa ji Yawûz re mektubeka wiha dişîne:

"Saadetti hudavendîgarim... Ji Amedê em bi beğen Kurdan ve wek yek dil û yek laş û yek reng em çûn ser Merdâne û Sersoran. Semken Sersoran ku (Ustaclû)- QEREHAN-I LA'ÎN dijminê îslamê ye.. .Arteşa me di mile çepê de ji Hıısrev Paşa û mile çepê jî begê Kemah Qereçîn-oglû û navdarên ekrad bûn... Li hember topên me Qerehanê Lain bi desthilatdarêEsfehan Çûka Siltan, beğen Kaşan, Siltaniyê, Çûkûr'şa'd û Kazwîn vê. erişe kir û heta pişti nîvro şer berdewam kir. Paşe serê Qerehani Laîn jêkirin û yen din jî revîn...]ina Şah-i La'în û xismên wî jî me dîl girtin.. d138-502) Di vir de niqta herî girîng em dizanin, ku Ustaclû ji Kurdên Laînî ne...Laîn navê heiêmêka li Xorasan e; li wir bi heman navî êleka mezin jî dijî ku ji wê re Laînî tê gotin û wek Reşiya, Celikî û Têrikiya ne. Gelek henekan dikin û mirovên xweşik in. Rengê sor hîna jî li cem wan wek kevneşopiyeke tê hêzkirin. Ittîfaqa Qerehanan ku tê hejmartin jî hemû begên Kurdan e.

Idrisê Bedlîsî jî ji Yawûz re vê mektûbê dişîne:

"Min agahiyên şer gîhandin her qûncikekî Ezerbeycan û Iraqê...îhtîlaf jî hebûn lê min çareserkirin...Ez bi xwe di nava Kurdan de bûm, ji berkû ew hertim di nava gumanan de ne...Di milê min ê raste de emîrên Kurdên mîna: Siltan Xelîlê Eyûbî, Mehmet Begê Sasonê, Qasim Begê Egilê, Mehmet Begê Zirkî. ..li çepê min Şeref Begê Bedlîsî, Dawid Begê Hîzanê, Ahmet Begê Atakê... Di şer de milê çepê li hember êrîsa Sersoran kete tengasiyê û têk çû. Lê ji Xwedê Qerehan mir û kurên emîrê Bîrecîkê Welî Xan: Hekimê Heratê Sarû û çendiken din jî çûn dojehê...Bi ser vê de bihevre berbi Beriyê reviyan... Kurdên di milê me yê çepê de, bi lehengiyeke mezin şerkirin ku mirov nikare bîne ziman û eger ew nebiyana em têk diçûn...Di vî şerî de jiber îhmal û kusûra eskerên Dulqadir arteşa misilmanan gelek wendayî dan...Min êlên Kurdên ku li rêya Şah ïsmaîl û Sersorên kafir in re lihevkir ku ew rê nedin Sersoran...Di

nava a^şa me de ydkîtî û hevkarî nîne, lê di nava Sersoran de îttîfaq û baweriya bi serokê xwe yê manevî gelek bi hêz e..."(138'507) Ji vê namê jî em dizanin ku eger Kurd nebiyana Osmaniyan di şer de têk diçûn. Dudiliya Dulqadiriyan jî balkeşe, mümküne ku bi zorê tevlî şer bûn û dilê wan jî bi Sersoran bû. Niqta din ê girîng jî ewe, ku hêzên Sersoran gelek bi îttîfaq û bawerî bûne.

cû d atî di navbera rêve biri ya Osmaniyan de tunebû. Ew yeka ji alî fermanê hatî dayîn ve eşkere xuya dike: di sala 1551 an de, Qanûnî ji begebeganê Amedê re fermaneke dişine û di wê fermanê de wiha dibêje: "Tu ji min re nameyan dişini û agahiyan didî; ku ji yeki êla Begdili re xelîfetiya êlê hatiye dayîn. Ew mektûba bi mohr ji ali begê Helebê ve ji min re hatiye şandin de: serokê êlên mina Kiliç, Mehmet û Eli ji min re şandin. Wan kesana nêzîkî Amedê dibin û talanê dikin. Ewên ku di qirêjiya Sersoritiyê de geriyayî pêwîste tu navêjî zîndanê û ji holê rakî! Heman fermanê ji Erzirûmê re, ji emîrê Zirkî û Şîrvane re ji birêbikî da baldar bin". (,5045) Di vê fermanê de jî xuyaye ku li hember Sersorî tu tolerans li cem Osmaniyan tune.

Gor deftera Osmaniyan muhaseba bajarê Qonya û Qeremanê di sala 1530 an de hatî nivîsîn me gelek navên êlên Kurd tespît kirin: Bereketlû-Eskîl û Canbeylî, Dulqadir-Tûrgût, Germiyan-Tûrgût, Canbeylî, Kose-Baybûrt, Şadî, Okçû-Kenarî Irmak. (m"62) Ji vê ew encama dertê ku Berkatiyê li Eskîl û Cîhanbeyliyê; Şadı bi Oxçûyan ve jî li dora çemê Kizilirmak bûne. Lê Dulqadir û Germiyan jî kîjan in mirov tam tespît nake; dibe ku Canbeg û Têrikî bin.

Di sala 1540 an de êlên Kurd ên li Besni

Heta sala 1540 an êlên li wir hemû girêdayî Kurd/ekrad Îzzeddîn Beg in. Di sala 1563 an de piraniya wan bi êlên li Mereşû re hatine girêdan.

1. Ela Bezikî: Girêdayî Kurd Izzeddîn Beg e. (Pa§ê ewê bibin Oxçû). Ji êlên îranê tên hesibandin. Di jêderên de wek êl derbas dibin, bi dîtina min ew ji êlan pirtir wek federasyona êlan xuya dikin. Berên xwe:

Ji wana Hewêdiya beşekî xwe li Xorasanê ye, gotin beşek jî li Hindîstanê û piraniya wan Êzdî ne. Yen Xorasanê niha bûne Şîa. Sewêdiyan jî beşekî xwe li Qonya û Aksarayê ne. Bi vî awayî em dizanin ku êla Sewêdî û yên din ên wê demê girêdayî ôxçiyane. Ew girêdana dikare tenê cografïk û li ser kaxizê jîbibe. Yanê, navê wê watê ku ew ji komekê têne. Navê Oxçî jî Tirkan piştre lê damne. Navê xwe yê derdora salên 1500 an Kurdên Îzzeddîn Beg in; yan jî Îzzeddînî ne. Çakallû jî li Xorasanê û li Mereşû hene. Lê pêwîste mirov ew hemûyan di cîh de bibine, ku bi rastî jî yek federasyon in an piştre tevlî hev bûne. Di cîh de

mirov dikare taybetmendiya wan bibîne û bine berhev û bigihêje encamekê. Gor defterên Osmaniyan, di bin navê Hewêdiyan de jî Oxçî têne nişan dan, ew jî diyar dike, ku ew piştre gihîştine hev yan jî tene li ser kaxiz e.

Yen jêrê bi Dulqadiriyan ve girêdayî ne:

3. Çaxirganlû: (Kirlar, Silêmanî,Yayd) —

4. Eymûrlû: (Dexşîr, Qaraca Arablû, Bexdatlû, Cacalû, ïncîlî, Mekelû)'288"841

5. Cerîd: (Bayir Cedîd, Soylemezlû, Sari Silêman, Kuş Qerelû, Tevekkülü).'167" 82> Li Gîlanê hîn bi navê Tevekulû gund hene.

6. Axce Koyûnlû: (İbrahim Kethüda, Yaxdlar) —

7. Araban: (Qere Yaxmûrlû) —

8. Çemeklû —

9. Gundeşlû (Dedeşlû-Çakali, Salman, Exîlaniû)—

10. Tacirlû: (Zikir, Oxçûlû, Tadrlî) —

11. Küşne (Deli Mehmet, Beşîlû, Qere Mûsali, Aldoş

Di deftereka din ê nifûsê dê girêdayî yorikên Qersî- Mereş, koma Qeremanî heye. Ew jî li dora Besniye zivistan derbas dikirin û berên xwe ev in:

1. Qere Hemzelî — — 8-8

2. Tûr Hecîlû — — 3-4

3. Azalû— — 3-5

4. Veladani Kopellû — — 12-12

5. Kizil Yûsûflû — — 8-3

Ji bo ku Kurdan biçûk nişan bidin û heqeratan bi wan bikin, carna navê Küpeli (bi guhar) wek kopek (sê) û kopuk (kef) dinivîsînin. Küpeli jî navekî tirkî ye û di wata kesen bi guhar de ye. Lê em dizanin ku ew Qeremanî ne. Ya ji bo me girîng ew e. Aliye din ê girîng jî, hinek ji vê komê li Semsûrê mane. Yanê ew ji Qere manan re viyan e, berê hatine Kurdistanê (Semsûr) piştre jî bi piranî çûne Xorasanê. Ji bo vê gelek îspat hene. Lê komên ji êlên Kurd bi giştî li Besniyê di sala 1519 an de 4864; sala 1524 an 8110; sala 1536 an 9461 û sala 1563 an jî 17.749 kes xuya dikine.'1091121 Ew baqiyê Qeremaniyan e.

Tl A 1*0 AA

Elen lı Semsure:

1. Reşî: Wek "Ekradê Tirkmen" tên bi nav kirin û ji Helebê heta Qastamonû terin. Ew jî îspateke din e, ku Tirkmenên tên qal kirin Kurd in û di vê de ti şik û guman nine.

Her sê êl jî niha li Xorasanê hene. îzdeganû min ziyaret kirin û dema min ew dît zanibûm ku ew Reşî ne. Dema min guhdariya wan kir û li wan temaşe kir, bawer bikin ku xwîna min dixwest ji damarên min derkeve. Ji alî fizîk, ziman, ehlaq û kevneşopiyan ve wek sêveka bi dû aliyan bikî bûn... Rûmiyan di demên kevn de ji Anadolê çibûn Iranê û dewleta Safewî damezirandin, Ew agahî jî îddea mamosteyê hêja Wekîlev piştrast dike.

2. Dulqadir: Li Mereş û Elbîstanê diçin zozan û zivistanê derbas dikin.

1530 1540

f. Tukuz (Qere Kosecelî) : ji Dulqadiran e û sê xane ne.

Li vir jî baş xuya dike, ku Zerikî tevlî Dulqadiran in. Emûrlû jî li Gîlanê-Reste ne ku ew xwe wek Reşî dibînin û navê xwe jî wek Amarlû/Emerlû tên zanîn. Beydîlî jî li Xorasanê hene, gundên xwe li dora bajarê Bojnûrdê ne. Xuyadike ku ew êlêna piştî 1519 an edî nema ne. Ew jî bi avabûna dewleta Safewî ve û bi erîşen Osmaniyan re girêdayî ye.

3. Kizillû: Dulqadirî ne 1530 1563

a. Eli Beyî 2 6

b. îmkan 9

4. Bezikî (1530):

a. Koprullû 9

b. Qere Orûçan 7

c. Tûrgay Adîllî 24

5. Tacîrlî:

a. Gannar 9-6

b. Firûzlû 19-6

6. Ekradî Kawî: Yoruk in. a. Boylan

b. Belîvan

c. Xelikan

ç. Boylan Dîger

d. Zengilan û Salmayan!

Wek tê zanîn Kawî niha li Kolikê dijîn. Şair Hüseyin Yetkin ji vê êlê yê û gelek şerme ku mirov wan wek Yoruk nişan bide. Ev ji mirovahiyê, dîrokê û ahlaqê re heqaret e. Xelikan ji beşekî li Qonya ye beşek ji li Xorasanê ne, lê dibe ku bi Kawiyan ve ji bavekî veqetî bin. Zengilanî li Xorasanê hene û di nava şaxa Keyvanlûyan de xuya dikin. Mümküne ku ew nava wek Kawî hatibe guhartin ji.

7. Dongeleli

a. Avsanî 20-25

Bi gişti di sala 1519 an de 6077 kes, di sala 1524 an de 5790 kes, di 1536 an de kes xûya nake, 1540 an de 20384 û di sala 1563 an de 23150 kes in. (109115)

Êlên H Gergerê-Kolikê:

Reşiya li Kolikê

Di van salana de xuyadike ku deh êlên giiêdayî federasyona Reşiya ne. Lê hinek ji wan navana em nizanin kîjan êl in. Wek mînak: Kellelû, Mendûbalî, Boxraci, Karlû û Mansûran ji bo ku navên kurdî guhartine, em nizanin kîjan êl in. Hecî Omeran îro em li navenda Anadolê wek Omerî bi nav dikin.

Omeriyên li Qonyayê a Navê xwe yê din jî Qeytanî bûne, ku li Xorasanê nêzîkî (Keyvanlû) wî navî êl hene ku bi van êlana girêdayîne: Mistikan, Vêran, Milan, Dêrûsan, Bêrîvan, Zengilan (li bakûrê Kurdistanê wek Kawî

xuya dikin), Lal, Cafkan, Xelan, Zîrekan. Sevran îhtîmaleke mezine ku Sêvikan bin. Celikan, Mo likan,

Zerikan hemû li Anatoliya Navîn û Xorasanê hene.

2. Bezikî: Di 1519 an de tê xuyakirin, pir mezine 13 berê xwe hene.

a. Saları 99-29 155-1 156-1

b. Nakibam — — 51-25

Êlên girêdayî: Hecî Xelîlî, Rûmiyan, Sînanî, Demranî, Cedûkan (di 1536 an de di qeydan de nine), Hesen Belli ne. Cûtikan li Navenda Anadolê xwedî çend gundan in.

3. Boylanî:

4. Bolasanî:

5. Reşî:

6. Kawi (Zengilan):

7. Leyvanî:

8. Gozî:

9. Çopî (çobû):

10. Halidî:

11. Millî:

12. Azebanî:

13. Kuşne-Tûxî: Di sala 1532 an de, li Gergerê ew 20 xane û 3 bêkar bûn. Wekî li vir jî tê ditin tevlîheviyeka mezin heye. Reşî li ser du navên cüda batine qeyd kirin û yek di nava yekî de ye.

Di sala 1752 an de li Atlantiyê Atçeken bi cîh bûn. (109118) Atçeken navê ku Tirkan li Canbegan daniye. Wekî berê jî me gotibû, ew qeydana di dema Qanûnî de ji bo ku bacê û eskeran ji Kurdan bistînin hatine kirin.

Wekî di tabloya jêr de jî tê xuyakirin gelek esker jî ji nava Kurdan digirtine. Avyarov dibêje: Di leşkeriya Osmaniyan de leşkeren Kurd bê şik dhekî girîng digirtin; di sala 1587 an de Kurdan weqas leşkeran dane Osmaniyan:

Wîlayeta Dulqadirî 5.100 kes Wîlayata Erzirûm 2.500 kes 1.600 kes 9.043 kes 1.800 kes 1.350 kes 29.193 kes in. (28)

Li vir dixwazim bala xwendevanan bikişînim, ew hejmarên bi piranî ye Kürden ku rojavayê Anadolê terk kiri ıı yen neçûne Iranê ne. Kesên manî bûn eskerên Osmaniyan.

Di navbera herdû Imparatoriyan de gelek caran li ser miletê Kurd û wrelatê wan şer, komkujî, malwêranî û koçberî pêkdihatin. Ew şerûn bê dawî, ji dagirkeran r£ jî dibû barekî ku nedikaribûn hilbigirin. Osmaniyan ji bo wan şeran gelek zilm li gel dikir; ji wan bi zorê leşker, bac û xwarin distend, lewre di kîsê dewletê de pere nemabûn. Ji bo van tengasiyan carna di navbera hevdû de peymanên lihevhatine çêdikirin. Lê wan pir dirêj jî dom nedikirin. Lewra êlên Kurd ên mezin li ser xaka welatê xwe dijiyan carna derbasî herêmên xwe yen kevn dibûn ku balansa mêzînê dihate guhartin.. Ji bo ku vê rewşe bidin rawestandin, herdû dewlet dixwestin ku sînor jî hebin. Yek ji wan peymanên girîng jî di sala 1590 an de pêk hat. Şah Ebbasbi Osmaniyan ve diheman sale de li Stenbolê peymanek imze kir. Li gor vê: Ezerbeycan, Gürcistan, Ermenistan, Şehrî Zor, Herêma Lolo û Hemedan derbasi Osmaniyan bû. Şah Kurmanc û Dimiliyên li rojava ajotin Xorasan. (39) Ji bo wê jî, êdî koçên mezin, jihev veqetandinên kür di nava êlên Kurd de pêk dihat. Ji alî din ve jî nerazîbûnên gel yen di nava dewlêtê de jî dibûn sedema serhildanên mezin.

Mehmedê 111 an, di sala 1595 an de, dema xwest here ser Awûstûrya û wê pirsgirêkê çareser bike, fermana edaletê belav kir û di wrir de

rêvebirên li Anadolê bi zilimkarî sûcdar dikir. Bi ser vê de, li Kolikê Abdalek bi meriyên xwe ve dest bi raperînê kirin. Paşe ew hate perçiqandin. Ji ber siyaseta Osmaniyan ku bi darê zorê êl li Anadolê bi cîh dikir; li gelek cîhan û li Semsûrê jî gelek serhildan çêbûn. (120_9) Ji ber zilm û xelk şelandina karmêndên dewleta Osmanî, êdî tehemûla gel nemabû. Ji bo wê komên ku firsend d i dîn direviyan alî Sefawiyan, yan jî alî Memlûkan. Ji ber zor û zahmetiya jiyanê ne tenê yen Şîa, yen sûnnî jî direviyan.

Sîstema eskeriya Sefawiya tenê ne li ser Şîan bû, ji Anadolê tenê ne Şîa, sunnî jî diçûn Iranê. Dema li Amasya peyman çêkirin, Osmaniyan xalek kirinê ku yên xwe avêtî paş dewleta Safewî divê şûnde bên şandin. Osmaniyan dixwest peşi li ber koçberiya ji Sêwas, Dulqadir û Helebê bigirin. (112'7,) Ew jî nîşan dide ku gelê Kurd wê deme ji Osmaniyan ne memnûn e; ne sunnî, ne jî şû. Ji bo wê jî gelakan dixwestin herin Iranê. Her çiqas Osmanî û Sefawiyan peyman çêkiribe û xwestin ji êlên dixwazin herin îranê re bibin asteng jî, nikarin. Atmaca lı Yozgat (1526), sala din dîsa li Bozok, Dulqadir Zûnnûn Beg; êla Hîsar Beg, Çîçek, Axca Koyûnî û Mesûdî li dora xwe komkir û serî hilda. Paşe dîsa di heman salê de Kalender Çelebî; ji Mereş (Qaraca û Bişan-Dokûz) û gelek êlên din 20-30 hezar kes komkir û serî hilda. (112'77) Bi vî awayî gelek serhildan çêbûn; lê yên herî fireh û bi bandor serhildanên Celaliyan bû.

Di dawiya serdema Yawûz de li Tûrhalê, §êxekî ji Bozokê yê bi navê Celai derdikeve holê. Di §ikeftê de jiyaneka bi Xwede re bi serê xwe dimîne. Ew kesa ji der dorên xwe eleqeyeka gelek mezin dibîne. Kesên cahil û nezan ji vvî gelek hêviyan dipên. Bi ser vê de gel li dora wî roj bi roj zêde dibe. Rojeke Celai xwe "Mêhdî" îlan dike. 20 hezar kesên siwarî û piyade lê dicivin û ji alî alîgirên xwe ve wek "Şah-Welî" tê binavkirin. Di demeka kin de gelek gund û bajarok heynan. Dewleta Osmanî Ferhat Paşa û Elî

Beg Şahsûwaroglû yê Dulqadir bi vê serhildanê re wezîfedar kirin. Ferhat ji Stenbol, Şah Siwar jî ji Elbîstanê êrî§î ser Celaliyan kir. Celai ji bo ku herê Iranê vekişî Sêwasê. Lê Şah Siwar ew li Şarkî-Qerehîsar girt. Di sala 1519 an de hate kuştin û serê wî ji Yawûz re hate şandin. Lê ji vê demê bi şûnde ji her serhildanekè re gotin Celalî. (,33'88) Yanê serhildanên Celalî ne yeke û ne jî diyare ku ji alî kîjan êlan ve pêk hatine. Carna ew şaş bi kar tê. Navê Celalî li ser hinek êlan ma ye, bi taybet

jî yên îro li Kazakîstanê û Qefqasan, lê di bin geh de Celalî piraniya Kurdên li dervayê vvelat in û hema hema hemû êl di navê de hene. Ew bûyerana ji alî nûserên cûda ve bi awayên cûda tên şirove kirin, ya herî rast ji alî Îzadî ve tê kirin:

Di sala 1519 an de li Tokatê yeki bi îddeaya nûnerê ruhê gerdûnî û bi navê Celal derket. Celal bi Naşire di sedsala IX an de derketî ve ji Pontûsê derketin. Ew herdûyan jî Zerdeştî wek bingeha olî û îdeolojiya civakî bingeh digirtin ku ew balkeşe. Celal navê Şah Ismaîlê têk çûyî heyna û îddea kir ku şerefa kraltiyê derbasî wî bûye. (154'n6) Mirov dikare bibêje piştî damezirandina Sefawiyan Kurdên li Anadol û Kurdistanê her tim di nava tekoşîn û şere bi Osmaniyan re de bun. Ew serhildana cama sar dibûn, lê heta salên 1700 an domkirin. Di vê deme de gelek ferman û komkujî li ser Kurdan pêk hatin, emê di beşen din qala wan bikin.

Di pêvajoya şere Awûstûrya de, hemû hêza Osmaniyan li eniya rojava bûn. Ewlekariya Anadolê jî komên sekban/levent jî pir bê sînorbûn û paşê ew zivirî serhildanê. Ewliya Çelebî di Seyahatnama xwe de qala paytextê Osmaniyan Bûrsa dike û wiha berdewam dike: Di dema Mehmetê III an de Celaliyên bi navê Qere Yazici, Kalender Oglû, Delî İdesen û Cennet Oglû erîşî Bûrsa kirin. Xelkê wir bihîst û li sê dorê bajêr qele çêkirin. (96cî!tI,'6) Di sala 1601 an de Sokûllûzade Hesen, Celalî têk birin û Qereyazici sala din mir; birayî wî Elesen cîhe wî girt. Ew tevgera li rojavayê

Tirkiye nayê dîtin, tenê li Anadolê gundî, koçber û se k banan serî bil dan û li Anadolê bel av bû. (,47‘,4) Ev yek ji serhildanên destpêkê yên gelê Kurd e. Wekî tê zanîn di vê salê de beşek ji Kurdên Reşî jî, bi zorê li Gîlanê-Iranê bi cîh dikin.

Êlên Kurdên ku çûbûn Rûsyayê jî di navbera salên 1603-1613 an de koçber bûn. Di serhildana Celalî de bi Abdûlhelîmê Riha (Qereyazici) re piştgirî kirin û ji bo vê hatin ajotin. Hikumeta başûre Kurdistanê ew qebûl nekirin ji bo vê ew çûn Erzirûm, Eleşkîr, Gole, Ahiska, Erivan, Tiflîs, Gêncê, Nahciwan, Mako, Kazwîn û Tebrîzê. Ew cîhên mîna: Meleri, Semsûr, Riha, Mereş, Dîlok, Xarpût û Amedê vala bûbûn jî Kurdên koçber hatin û bi cîh bûn. (2S| Ew êlên çûbûn piranî yên girêdayî Reşiya ne. Sosyologê Îngîlîzî yê bi navê R. Tapper, li Ezerbeycanê û Iranê lêkolîn kirin û di encamê de dibêje, êleka bi navê Seneklû ya Kurd heye, lê ew bi temamî bûne Tirk. (49) Mixabin gelek êlên Kurd bi taybetî jî li Ezerbeycanê bûne Tirk; yek ji wana jî pismamên Reşiyan ku ji wê re Qereçorî tê gotin in. Kurdên ji ber zilma Osmaniyan dirêviyan bi piranî xwe davêtin paş Sefawiyan. Ji wan 20 hezar Celalî yên ku xwe avêtibûn bextê îranê, Şah Ebbas xwest ku 8 hezaran li nav ûşîreta Bradost bi cîh bike. Lê Xanê Çeng Zêrîn a bi nav û*deng ev yeka qebûl nekir û şer dest (1608) pêkir. (59) Bi vê yekê wî dixwest Xanê Çeng Zêrîn lewaz bike; ew fermandarê Kurd ê leheng bi hêz dibû û Şah jî ji vê yekê ditirsî, bi vî awayî ew jî planeke ku Kurdan bi hev bide kuştine bû. Çeng Zêrîn jî dikarîbû wan qebûl bike û hîn bi hêztir bibùya, lê xuyaye ku wê demê Kurd pir teng difikirin.

Tiştekî balkeşe ku Kurdan piştî dewleta Şadî pir kêm yekîtiyên mezin çêkirine; di serdema Pezgewr û Beraniyan de yekîtiyê nêzîkî wî rengî h e ne, lê ew bi piranî li dijî hev di tevgerê de bûne. Ji alîkî ve di nava hev de ji alîkî din ve jî, bi dijminên !i dor û ber re tekoşîn gelek zahmete. Piraniya Kurdan wek êl yan jî federasyonên êlan serbixwe jiyane. Pezgewr,

Bayindir û Begên Dulqa- dirên ku fêrî bi serê xwe jiyinê bûbûn jî, nediketin bin fermana Osmaniyan. Ji bo ku mîrîtiyên xwe jî winda kiribûn li Osmaniyan bi hêrs bûn û ti caran jî xwe ji serhildanan paş ve nedan. Di serhildana Celaliyan de bandor û rola wan hebû. Di serhildanên sedsala XVII an de jî rola Pezgewran hebû.tlI4"270) Bi sedsalan Tirkan bi hêzên Kurd re şer kiriye ku wan têxe bin xizmeta xwe, yan jî di nava xwe de bihelînê. Le pir hindik bi ser kefiye.

Carna Kurd di nava dewletê bi xwe de jî dibûn sedema pirsgirêkan. Di dema raperîna Celaliyan-Kurdan de, li ser postê-wezîrtiya Kurden wek Tirkmen bi nav dibin jî alozî derketin. Ew jî dîsa îspateke ku çawa Tirkan, Kurden wek Tirkmen bi navdikirine. Li ser axatiya Tirkmenan (1601) di navbera Hesen Axa û Ak Alî Axa-Dewlet de nakokî derket. Hesen li herüber Stenbolê, ji Bolu wan deran esker komkir û hate ber deriyê Stenbolê. Ji ber vê yekê Ak Alî jî tirsiya û dev ji axatiyê berda. Axatiya Tirkmenan li holê ma. Ji sîpahiyan Axa henefî Çelebî û Daşnik Emîrze ji bere ve jî kesên xizmetkarbûn û ji bo Boz Ûlûs, Qere Ûlûs, Atkeşan û axatiya Uskudar Tirkmen bûn berendam. Bi riya darêzorê "bibin xwediyê naneke" û deynê xwe yen dewlete ji çend kîsan vê derbas kiribûn, lê ew jî ji roje avêtin rojê û ji tirsan ew jî reviyan Uskudarê. Ji wir jî çûn Helebê. (%/m/72) Ew di nava dewletê de şerekî dide xuyakirin. Ew Ûlûs û Tirkmenên qal dibin jî kalê Kurdên li Anadolê ne. Berdewamiya Boz Ûlûs îro: Terikî, Mirdêsî û Zerikî ne. Qere Ûlûs jî Reşî ne; Tirkmenê Atçeken Canbeg û Uskudar jî Kurdên Sewêdî ne.

Nûser Orhonlû li ser beş kirin û binav kirina Osmaniyan yên êlên Kurd dibêje: Di dewleta Osmanî de koçerên Kurd di bin sîwana "II" yan jî "Ûlûs" de dihatin komkirin. Bi vi awayî dihatin dor kirin: Boy (êl-e§îret), oymak (cemaat-qebîle), Oba (mahalle-tax). Serokatiya êlan miran dikir. Dema serokê Elê bê hilbijartin, bi giştî serok û mezinen êlê biryar didan û

dewlete jî ew dipejirand û dibûn Mîrê êlê. Tenê êla Reşiyan cûda bû. Arîstokrasiya êlê û rûspiyên wê biryar didan û kî bixwastana dihate pejirandin.{9014) Bi ditina min, boy di nava Kurdan de wek zend e, oymak jî êl in û oba jî malbatên girêdayî êla ne. Kopraman jî dibêje: Ji rnîrên zendan re digotin "boybeyî"(149127);di nava Kurdan de ew Begêbegan e yan jî Mîrêmîran e. Ji cîgirê wî re jî digotin "kethüda", ew herdûyan têkiliyên dewletê bi yên êlê ve sererast dikirin. Gor defterên tahrîr yên sedsala XV û XVII an, koçber wiha belav dibûn: Qere Ûlûs: li başûre Gola Wanê, Boz Ûlûs: li Amedê, Dulqadir û Yenî II: di navbera Mereş û Sêvvasê, Bozok: li keviya Kizilirmak, Uç Oklû û Remezanî: li Torosan dijîn. Li cografyeka gelek fireh belav dibûn. Wek mînak: Boz Ûlûs, komeka ji 40 hezarî pêk dihatin û xwedî du milyon sewalên serçûk (mî û bizin) bûn. Ew

ji dest Abaza xelas kir. Erzirûm bajarekî rind e, lê sar e; pişik dema ji xaniyekî bazdide xaniyê din, li hewa dicemide û heta Newrozê bi awayî dimine. (96'86) Niqta girîng ev e, ku dema qala Newrozê dike, wek îdeaka ji alî herkesi ve te pejirandin û nikare ji nedî ve beyî ye. Yanê heta wan salana jî bandora çand, kevneşopî û ola Kurdan diyar e. Yek jî ne tene li Kürdi s ta ne, li rojava jî Kurd bi dewletê re di nava tekoşîneka mezin de bûn.

Li ser vê E. Çelebî serpêhatiyeka xwe ya balkeş radigihîne: Ji Eskîşehîre çûm Akşehîre. Li gundekî çiyayî bûm mêvan. Sibê min mêzekir, ku li ser hespekî ye kî bi dest û pê girî tê. Min agahî stend ku ew di cenga Uskudarê de (şere Celalî û Osmaniyan ê li Stenbolê) serleşkere yekîna Çomarê bûye. Sîmelên xwe gihîştibûn guhên wî û mirovekî bi xof bû. Min bi zorê da rûniştin û me bi hev re xwarin xwar. Min ji wî re got "bira" ri ji ser wê, hat li cem min rûnişt û got; te bawerî bi min anî min jî bi te, te ji min re got bira. Ez ji êla Îzolî ya Kurd im. Li Stenbolê em têk çûn û çiya bi çiya ez

hatim vir. (96/IIV20) Ji vê agahiyê em fêr dibin, ku êla Izol jî di nava serhildanê de bûye. Piştî serhildanên Celalî Kurdên îro li dervayê welatêdî, yan çûn Iranê yan jî bi temamî ketin bin desthilatdariya Tirkan. Heta dema Mûradê IV an, Osmaniyan bi riya otonomi bi Kurdan re îttîfaq dikirin. Lê di dema wî de em dibinin, ku ew tê guhartin û îcar ji holê rakirina mîrîtiyên Kurd ji xwe re dikin armanc.

Di dema padîşahe Osmanî Mûradê IV an (1623-1640) de jî Kurdan gelek eş û elem dîtin; wî paşayî dixwest mîrîtiyên Kurdan ji holê rake û hemûyan bi dewleta navendî re girêbide. Mûrad, dema çû raperîna Sûbaşi Bekirê Bexda (1626) li ser riya xwe serhildanên li bajarê Payas, Iskenderûn, Heleb, Dîlok, Bîrecîk, Riha û Amedê bi xwîne têk birin. Wek xuya dike li vê herêmê bi piranî Kurdên îro li Anatoliya Navîn û bi taybetî jî Reşî, Têrikî, Celikî, Oxçû, Sewêdî dijîn. Li bakûr jî Sadrazam Xelîl Paşa ûrîşî Iranê kir. Xelkê li herêma Ezingan, Dêrsîmê erzakên wan temîn dikirin û di vî alî de gelek zahmeti kişandin. Du caran çû ser Bexda; yek di sala 1635 an de, ya din jî di sala 1638 an de bû. Elên Kurdên li Badînan, Mûsil, Hewlêr, Kerkük, Şehrî Zor jî beşdarî wan şeran bûn. Mümküne ku eşîra Şexbizinî jî wê deme ji cîhe xwe hatibe derxistin. Bi vê kome re girêdayî kon/federasyon a Caf bû du alî; yek li Iran, yek jî li aliye Osmaniyan ma. Beşekî Şexbizin li alî Osmaniyan e. Yeşîlgoz dibêje, di salên 1621 an de Osmaniyan êdî sîstema bicîh kirina êlan dan destpêkirin. (39) Evv îddeayeka di cîhê xwe de ye, lewra ji vê demê bi şûnde, tê dîtin ku politika dewletê hatiye guhartin. Ji vir û pêve jî, ew yeka heta salên 1800 an berdewam bike.

Dewleta Osmanî dixwest bi her awayî ji Kurdên koçber îstîfade bike: Mîna ku di naqliyê de bikar bîne; ker, heştir û qantirên wan ji wan bistîne; di raperîna navxweyî de wek înzîbat jî bi kar dianın. Di sala 1686 an de ji bo sefera duyemîn a Awûstûrya, ji êlan re emir hatin şandin û hat tespit kirin

ku divê ew ji artûşâ ra çiqas nefer bişînin. Yawûz Selim ji Danişmendiyan 400, Kilis Ekradî (Şexan, Okçû-Izzeddîn, Amîkî bi cîh bûbûn. Lê malên wan di sala

1705 an de ji dest hatin girtin û hatine firotin) 500, ji hakime Çolê 400 xwestin, lê ew gotin nikarin weqas kes bişînin û îtîraz kirini90“271

Li dawiya sedsala XVII an Osmaniyan êdî dest hi polîtîkayeka nû kirin; ew jî êlên Kurdan ji sînorên dewletê dur û yen nikaribûn kontrol bikin bi cîh kirin bû. Yek ji wan herêman jî deşten Sûriyê bûn. Gelek sedemen vê hebûn: Di serî de dixwestin ji êlên nayên bin kontrole rizgar bibin û careka din pèle kî mîna serhildanên Celalî ve rûbirû neminin. Yen din, li hemberî erişen êlên Ereb sînoran bipareze, ji gel bac, esker bigre gelek sedemên din jî mirov dikare bihejmêre. Ji bo vê armancê, paşen Osmanî gelek ferman li ser Kurdan derxistin û eme wan di beşen peş de binivîsin. A. Refîk dibêje: "...Wan salana (1706) piraniya êlên li Anadolê di nava serhildanê de bûn û dewlete jî hertim hewl dida ku wana li Rakkayê bi cîh bike. Ji êla Mamali Elçî Oğlu, erîşî Akça Koyûnliyê girêdayî Walîde Siltan kirin. Ela Cirid a li Ifrazi Dulqadir rastê ârîşa Yûsûf Paşa hatin û reviyan çiyan. Ji bo ku êlên din jî xirav nekin, dewletê xwest ku wana bişîne Rakkayê. Di heman demê de Kacili yê li Hamayê bi cîh bûbûn jî reviyan Anadolê. (l6l142) Wek tê zanîn Reşî di sala 1697 an de vegeriyabûn navenda Anadolê. Tê fêhm kirin ku piştî hatina wan jî, dewletê hewl daye ku êlên din bişîne. Piştî wan jî, êlên mîna Canbeg û yen din vegeriyabûn.

Bi kurtî mirov dikare bibêje, ku ji destpêka Osmaniyan heta serdema komara Tirk, wê dewletê zilim li Kurdan kiriye. Carna ji bo berjewendiyên xwe, rûyê xwe yê nerm bi Kurdan nîşan dane, lê ti caran ji peşeroja Kurdan û mafê wan re hürmet nîşan nedane. Gelek caran li ser gelê Kurd komkujî pêkanîne. Di dema dawî de jî Mehmûde II an artöşe dişinû ser Emîrê Soran Mir Muhammed. Reşîd Paşa di riya Samsûn, Sêwas û Meletî

re; yê din jî, di riya Trabzon û Wanê re çû. Di sala 1834 an de artê§a Tirk li Kurdistanê komkujiyek mezin çêkirin. Li Sêrtê, li dijî îttîfaqa Ermenî û Kürden Ezdî jî şer kirin; mixabin hêzên hevkar têk çûn û hemû reviyan sînorên Rûsya. Di vî şerî de 10 hezar Kurd mirin. Ji mirina Reşîd Paşa şunde, şûna wî Hafiz Paşa derbas bû, di vê demê de bi hezaran gelê Kurd kuştin û şêlandin. Hafiz Paşa, di zivistana sala 1839 an de li Meletî derbas kir. Bi biharê re erîşî Akçadaxê kir, ji çar rojan şunda keleha Kurnak dagir kir, mêr kuştin, zarok şandin Stenbolê û jin jî şandin Meletiyê. (26> Bi zorê bi cîhkirina Kurdan ya li Anadolê heta sala 1850 an dom kir. Piştî van salan hinek koçberî bê dîtin jî, kêm e û ne demdirêje. Piraniya wan di nava herêmêkê de nîvkoçer jiyane, lê ti caran koçberiyên dûre pêk nehatine. Piştî van salana em dibinin ku dewleta Osmanî, welat dike 35 eyalet.

Li gora salnama Osmaniyan a sala 1856 an dewlet dibe 35 eyalet, emê wîlayetên ku mè eleqedar dikin binivîsînin:

16. Eyaleti Hûdevendigar

Lîvayî Kütahya; Eşîretî Şûhûdlû, Siraçlû û Harzern (Bi Germiyan re koçber kiribûn)

Lîvayî Qerehisar-i Sahîp: Êla Bozûlûs û Mûslûca Lîvayî Balikesîr: Ela Heremeyn-i Şerîfiyn (Kildonlıı)

17. Eyaleti Qereman:

Lîvayî Teke Lîvayî İçel

Lîvayî Qonya: Kûreyş Divle û Ozû

Lîvayî Nîxde; Ela Mûhacîrinî Acem, Cerit (Pazarcik), Koçeklî, Şereflû

18. Eyaletî Adana:

Lîvayî Mereş: Pazarcik, Hacilyan, Elbistan, Peşî, Borkan, Soxutî, Nadilî, Çakanî (Tîreka Sadica ye û li Dêrsîmê hene), Celikan, Sinemîllî, Kiliçî, Atma, Ç. Cerîdî, K. Cerîdî, Bûlanikan,

19. Eyaletî Bozok {Yozgat):

Lîvayî Bozok: Ela Mamalû (Bi dîtina min Mamitî ye) Vê eşîrete cara yekemîn serhildana Celalî da destpêkirin.

Lîvayî Enqere: Êla Taban û Boz Ûlûs, Cîhanbeg, Şex Han, Atma (Li Arapgir û Pazarcikê jî hene), Moratî, Ziveî, Cemyatî.

Lîvayî Çanqiri: Milan (Mêrdîn û VVeranşehr), Nailî, Înalî, Balî.

20. Eyaletî Sêwas:

Lîvayî Amasya û Çorûm: Ekrad-i Çorûm, Qere Hisari Tîmûrçî, Mea Katasaray Taht-e Tarik

Lîvayî Sêwas: Kilimgad, Millî, Kawı mea Barikî, Saxci Mea Badilî, Lîvayî Gümüşhane: Korto-i Zûr û Bala u nahiyeye Kuzevid.

Êla Reşiya vê ku li dora Amasya, Tokat, Çanqiri, Enqere bi cîh kiribûn havînan diçûn Erzirûmê; padişah emir da fermandarên xwe, lê Reşiyan digot em 150 sal in diçin wir û tên û bi Kürden ku)i Mêrdîn û Şehrî Zor ve hafine re şer kirin. (39) Ji bo belavbûna êlên din jî Moltkê dibêje: Di sala 1838 an de em ji deşta Pazarcikê derbas bûn, li vê deşte sê êlên Tirkmenên bi navê: Atma, Kiliç û Sinemilî bi cîh bûbûn. Her sê qebîle(!) di 2000 konan de rûniştibûn. Reşît Paşa hişân Kürden bi qudret anîbûn seiê wan bi şûnde, wan Tirkmenan jî ji hikumetê hêz dikirin û ji salê 400 kîse akçe baca xwe didan. Ji wana hinek bi ziraetê re mûjil bûn. Kiliçliyan ji 600 siwarî zêdetir hêz derxistin; ew qebîlên din peya şer dikirin. Hespên xwe bê qusûr bûn. (16Ğ'1:ı7) Ji wê deme bi şûnde dewletê pirsgirêka heri zor bi giranî çareser kiribû û êlên koçber bi cîh kiribûn. Ji bo ku ew êlên hatibûn bi cîh kirin careka din ji cîhên xwe ranebin, sîstema "Derbend"

avakir. Dewletê ji tecrüben bere ders girtibû û berê çend caran êl bi cîh kiribûn, lê ew nesekinîn û çûn cîhên ku bi xwe dixwestin. Ji bo vê, dewletê ji nava wan û ji nijada wan sîstema korîcîtiyê bi pêş xist û navê derbend lê dank Wekî tê zanîn 'der' di kurdî de tê wata dêrî û 'bend' jî girtin e.

DERBEND

Dewleta Osmanî ji bo ku Kürdenbi darê zorê dabû koçber kirin, li cîhên şandî bimînin, vê demê sîstema korîcîtiyê yanê "Teşkilata Derbent" ava kir. Li cîhên stratejik qereqol ava kirin û nava wan ji, gelek caran bi leş keren Kürden girêdayî hikumetê tijî kir, ku Kürden vedigerin welatê xwe re bibin asteng. Ji vana çend wiha ne: Di navbera Riha û Bîrecîkê de Çarmelik, di navbera Ayaş û Berendî de Kurt-kulaxi, li navbera Misis û Antakya Baxras, li Kirşehîre Kesik Kopru, li Sêwasê Alaca-Han û Hesen Çelebi ye.<3S) Xale bave min Hecî yê Mamî Tozê (1903-1989) digot: Êla me dixwest dîsa vegere Kurdistanê, lê derbenda Kesik Kopruyê girtine û yen me nikaribûne, bi vî awayî em parçe bûne.

Heciyê Mamî Tozê

Cîhên derbenda, bi awakî dora xwe bikaribe kontrol bike dihate avakirin. Bi pir cini li cîhên bê kes, li ser rêyên ticarî û eskeriyê digihijin hev û li gelî û li çiya avadikirin. Berpirsiyartiya derbendîciyan ya heri girîng, bi gotina nivîskar: tekoşîna li hember rêbiran û xaka jê berpirsiyar, ji ârîşen wan parastin bû. (155'n) Wek jenderma ewlekariyê temin bike, çêkirin û parastina riyan û cîhên bêkes zîndekirin bû. (I55'65)

Dîsa Orhonlû dibêje: Kesîk Koprî ya li ser Kiziiirmak û nêzîkî Kirşehîr xerab bû û bûbû cîhê rêbiran. Gundiyên Mezra Yaylacik û gundê Yilanca yê girêdayê Hecî Bektaş ji bo Kesîk Kopriyê hatibû tayîn kirin. Ji bo rêvebiriya wan jî axayekî pire hate tayın kirin, di sala 1156/1744 an de bû. (155'42)

Mirov dikare ji wir jî derxe hole, ku kalên me cara dawî beriya wê tarîxê hatine. Li eyeleta Qeremanê jî êla Beydîlî li Hortî Han (îro bi navê Gundê Hortû ye û li ser riya Erexlî-Qonya ye) wek derbendwan hatibim tayın kirin/155"52’ Di derbende Sofîlarê nêzîkî Haymanayê de 30 derbendwan hebûn û di sala 1764 an de ji wan re axayek hate tayîn kirin.1155"77) Di sala 1753 an de ji Gundê Atlandi yê di navça Tûrgût de, Abdurahman Axa yê ji Bozûlûs ji bo serokatiya wan tayin kirin. Sedema wê ew bû; ku Elên mîna Hemze Hecî, Nemrûdî, Danişmend, Qere Xelîl, kesên girêdayî Izzeddîn li Esb-keşan/Tûrgûtlû wek derbendwan hatibûnbi cîh kirin/155'79’ Di sala 1693 an de, derbenda Çar-Melîkan di navbera Riha-Bîrecîk, Kurt-Kulaxi ya di navbera Ayas û Berendî, Kesîk Kopru dîsa hatin tamîrkirin û teqwiye kirin. Wek derbendwan jî kesên koçber lê hatin bi cîh kirin. Di sala 1697 an de, ji Sarili, Koselî Avşaren girêdayî Danişmendan 71 kes li Mîsîsê bi cîhkirin/155'106’ Di sala 1705 an de ji Dulqadir, 25 êl (Mihmadî, H. Hecî, Tatîş, Mûsa Fakî, Cûy, Anamas, Çîxdem, Afşar, Qereman, Sokman, Dîrek, Demire, Çakal, Çixrik, Tacîr, Saab, Kaçar, Aydin, H. Abdurrahman, Terzî Cerîd, Komur Cerîd, Qereman Hecî) Kurt Kulaxi ya girêdayî Adana-Berendiyê wek derbendwan bi cîh kirin/155'106’ Di sala 1720 an de navbera Akşehir û Ilginê 200¬300 malbat hatin bi cîh kirin/155-111’ Li herêma Tûnca ya girêdayî Haymanayê jî, di sala 1731 an de, gel Padkarê girêdayî Bozûlûs, Şûx Ahmedî û yen din li wir pere komkirin û xan û mizgeftek avakirin. Wek derbendwan jî ji Bozûlûs, Sêx Ahmedî, Huseyn Hecî, Sakî yê girêdayî Oxûlbeylî-Bozûlûs hatin bi cîh kirin. Küşne ya girêdayî Bozûlûs a li Qereman dijî bo şerta baca xwe bidin di sala 1731 an de hatin bi cîhkirin/153'112’ Ew herêma wek Tûnca derbas dibû îro wek Toyçayir e û li dor berê wê hemû êlên Kurd lê dijîn. Ji wê em dizanin ku di sala 1731 an de ew bi cîh bûne.

Heman nivîskar dibêje: Derbend ji bo ku komên şakî neyên belavkirin wek kilîdê bikar dihatin. Ji bo wê jî, derbend dibûn cîhê tekoşîna şakî û dewletê/155"66’ Şaki yen tên gotin Kurd in û ji bo ku wan kontrol b ikin nehêlin ku ew herin cîhên din jî, ew derbend sîstemeka esasî bûn. Di sala 1706 an de, êlên berê li Rakka ye hatibûn bicîh kirin ji bo ku neçin zozanan ew cîhên stratejik hatibûn girtin: Rira Mereş, Derbendê Hudî, Saraycik, Akyol, Mîsîs û Tarsûs; riyên diçin Andirin, Payas û Edenê; Derbenda Zeytîn, Katranli û Kopru; Pira Altin, geliyê Arslanli, Panbûcak, Mekilû, Kanlibel, Pira zêrîn, Peşenlî, Uçdere hatibûn girtin. Ji bo ku derbasî Anadolê nebin derbenda Akyol jî hatibû girtin/155'66’ Lê dîsa jî Kurdan xwe avêtibûn Torosan û bi dewletê re şer kiribûn. Heman nivîskar dibêje ew sîstema ji dema Mûratê II an vir ve heye: Di nava Osmaniyan de derbenda wek saziyên dewletê, em ji dema Mûratê II an (1421¬1451) û Mehmet ê II an (1451-1481) vir ve dibînin/155"18’

Gor tedbîrên dewletê jî bi cîh kirina êlên Kurd di nava gelê Tirk de dibû sedema fikar û tirsan. Ji bo ku êlên Kurdan gelek şervan bûn, Tirk jê ditirsîn. Yan ji wan dur diçûn an jî cama şer derdiketin. Cama jî, ji bo ku şer dom neke miletên din di navbera herdûyan de bi cîh dikirin. Di navbera Sînop û Rey- hanliyê jî Çerkez hatin bi cîh kirin, ku xwestin lihev nekirina di navbera Kurd û Tirkan de bi dawî bibe. (62) Çerkez yan jî gelên din ji bo Tirkan vvek tampon bi kar dihatine. Hema sîstemê mirov dikare li Xorasanê di navbera gundên Kurdan de jî bibîne. Pars û Tirk di navbera gundên Kurdan de bi cîh kirine.

BERANÎ

(Qerekoyûnlû)

Di ciîroka Tirkan de navê wan Qerekoyûnî ne, yanê ewên xwedî 'miyên reş' û gor nûseiên Tirk ew bê niqaş Tirk in. Bi piraniya nûser û lêkolînerên biyanî jî ew yeka dane pejirandin. Gelo em çavên xwe bigirin û vê yekê

yekser qebûl bikin? Bê guman na, min ew ji hemû nûseran hêvî dikir lê gelek ji wana mixabin îddea û gotinên Tirkan hema qebûl dikin û pediviyê bi lêkolînên kûr nabînin. Dema mirov hinek kûr lêdikolê, bi wêneyekî din re rû bi ru dimîne:

F. Sumer dibêje: Ji vê xanedanê re "Beranlû" tê gotin; lê nayê zanîn ku ew nava ji ku tê. Mînorskî dibêje Beranî ji Yiwa tên. (13,168) Sumer di pirtûkeka din de jî dibêje: Xanedana Qerekoyûnlû yê bi navê Beranî derdikeve pdş me. Ji îfada nivîskarên "Vakıa Irani" û Tirk tê fêhm kirin ku ew navê xanedanê bûye. Lê em wate, kok û armanca vê peyvê nizanin. Di tirkî de ew peyva nine. Lê eme dizanîn ku Beraniyan girîngiyeka taybet didane pez. (110'17) Wata vê em dizanin û base ku navê komê yê kevn Beranî ye; di kurdî de beran tê wata pezê nêr. Koka wê peyvê xas kurdî ye û raste ku di tirkî de jî peyveka wiha nîne. Gotina din ê ku girîngiyê didin pez jî raste; lewra Kurdên koçber û pez du ^tên ku jihev nayêne veqetandin in. Lewra ew pêza nebiya wana nedikarî jiyana xwe bidana berdewam kirin; ji bo wê jî pez qûteke konê jiyana wan e.

Di beşa Ereb de min nivîsîbû ku birêz C. Celîl ji "Dîroka Faûtûs, Dîroka Qalaxlî " radigihîne, ku di serdema Sasanî û Grekan de êla Cunûkanê li bajarê Darê de bûne. Yûnanî Cunûkan li: Riha, Heieb, Amîd, Nisêbîn, Nînova, Sîncar, Cizîr, Finîk, Beytuşebabâ nîşan didin. Van Cunûkana yên îro li dora Enqere, Nevşehir, Kaxizman, Bako, Sel mas, Xorasan, Xuremebad, Flemedanê û Flelebê dijîn. Di vê deme de, ola wan ji mezhebeka Zerdeştî ya bi navê Tiraîlî bûye. Agatxangelosê Romî vê demê ji bo ola Xiristiyanî belav bike hatiye wan deran (332-BÎ) û Kurdên bi navê Mamokyan-Mamokane kirine Xiristiyan. Ereb ji welatê wan ra dibejin "Dar El Beran", Osmaniyan jî gotiye "Beran Yurdu" (Mûş, Xelat, Erdîş, Malazgirt, Xinis e). (2A) Şopa vê êl an jî komê çar pêne hezar sal dirêj dibe û mirov şopa wan li warê Bextiyariyan de jî dibîne.

Di nava Mirdêsiyan de jî şopa Beraniyan heye. Bi vê re girêdayî birêz Hoko dibêje: Mirdêsî di serê sala 900 an de gava êla mezin a bi navê Mehmûdî, ji dora Mûsil û Şehrîzor batine durxistin... Ji Hekkariyê dema hatine rojava, ji xwe re FÛran, Xarpût û zozanên wir kirin war. El û berên Mehmûdiya ev in: Aşmîşarat, Bala Beranî, Bergîlî, Delîkan, Babikî, Siwedanî, Birkanî, Mişkanî, Şikakî, Reşwaıy, Rêswanî, Lewabî, Keşahî, Lewanî, Cemanı, Mihrîkanîkî, Wexşanî, Pismanî, Pûnyanî, Cezîranî, Mîranî, Bikanî, Dodanî, Dumkanî, Sêvkanî, Yûsûfanı, Sadkanî, Mêrkanî ne. (3Z)

Ne dûr e ku Mamokyan bi Mehmûdiyan ve jî heman kom bin. Bi vî awayî Mehmûdî wek konfederasyonekê xuya dike û gelek zore, ku mirov wan bi Beraniyan ve jî hev safî bike. Lewra heman êl û federasyonan gelek caran

bi naven cuda mohra xwe li diroke xistine. Ew carna wek Berank carna wek

Mehmudi, Reşî û weki din derdikevin peşberı me.

]ınen Sevıkan yen jı Günde Ome-Qonya

Weki nivıskaren rojava dibejin: Di alaya Beraniyan de wêneya heran

tespiteka di cm de ye. Di ala wan de, di

keviren goristanen wan de u di gelek al aven wan en din de wêneyen berani

heye ku ew sembol a wan bû. Eğer mirov coğrafya Kurdan bide ber çavan,

te ditin ku her cıhen ku çune ew heykelana çekirine. Li günden dora çiyayên

Bmgole gelek heykelen berana ye hene. Van heykelana yen Beraniyen Reş

u Akkoyuniyan/Pezgewran en ku li dora VVarto-Gimgim, Xinis, Kaliova û Şuşare ne. Sala 1934 an min raporek da navçe u paşe hatin ji wan heykelan 8

heb birin muza Amedê. Wana yên bav û kalên Hormekiyan bûn. Yek ji wana jî yê Mehmedê kurê Hesen Xanê Hormekî bû. (127'63) Em wana li Loristan, Bakûrê Kurdistanê, Kutahyayê jî dibinin. Tenê ne kevir, cîhên çûnê jî bi navê xwe xwendine.

Li ser vê babetê Rişwanoglû niqtên balkeş dinivîsîne: Di salên 226-240 de ji Çînîstan/Kaşgar hatin Iranê. ji wir jî hatin Mûş, Axlat, Ercîş, Bedlîs, Melazgir û Xinisê. Wan deran wek "Dûrûberan-welatê Beran" binav kirin. Navê zenda wan Mamikan bûn ku prensên xwe jî Mamik û Konak bûn. Di salên 412 an de tîpnivîseka mîna yên Yenîsey derxistin holê. Di sala 1295 an de bi Ilhaniyan ve misilmantî qebûl kirin. Pişti vê em wana wek Beranlû/Qere-Konlû dibînin. (I28‘ 58) Tîpnivîsa wek a Yenîsey jî dîtineka di cîh de ye; lê bi dîtina min, wana ew nivîs nû dernexistin, bcrê jî pê dinivîsandin. Kîtabeyên Yenîsey jî îspata vê ne; wekî me li destpêka pirtûkê jî nivisî, federasyoneka êlên Kurdan li wir jiyaye li ser keviran kurte dîroka xwe nivîsîne. Ne dûr e ku ew kalên Beraniyan bin.

Doç. Eroz radigihîne ku Tabarî wek: "Al-Atrak al Baraniyan" nivîsandiye.<'w‘24> Bi dîtina min ew tê wata Beraniyên koçber; lewra gelek jêder ji bo Kurdên nişteclh peyva Ekrad, ji bo yên koçber jî E/Atrak bi kar tînin. Ew jî vekirî dide xuyakirin, ku Beranî beşek ji Kurdên koçber in. Heman nivîskar bi berdewamî dibêje: Ev jî dide xuyakirin, ku Kurmanc bi Beraniyan ve û bi Qerekeçîliyan ve û bi Tirkan ve merivê hev in. (99‘24) Ev hevok ji bilî Tirka raste û nivîskar îşaret bi dîroka Kurdan ya balkâş dike. Beranî gor dîtina min jî de- mekê li Asya bûn, dema li Yenîseyê nivîsîn û digotin: êlên min neh (9) in, salên min çil (40) e... Ew: Beranî, Germiyan, Qerekeçîlî yek êl yan jî federasyon/kon- federasyona êlan e. Ew gotin di

heman deme de dîroka wan jî dide xuyakirin. Nivîskar dixwaze bi vê rastiyê de Tirka jî bizeliqîne, lê ew pîne nagre.

Birêz Xemgîn jî wiha qala dîroka wan ê dem dereng dike: Ji alî Bayram Xoce ve di sala 1366 an de hate damezirandin. Sala 1380 Xoce mir û şûna wî lawê wî Qere Mehmet hat. Wî bi Tîmûr re şer kir û têk bir ku nekeve Kur¬distan. Di sala 1389 an de mir û §ûnê Qere Yûsûf hat. Di vê demê de artûşa Tîmûr Kurdistan bi temamî talan kir. Tenê li Isfehanê 60 hezar mirov kuştibûn. Kurê Tîmûr Celalettîn Mîran Şah bû waliyê Kurdistanê, lê ew ji bavê xwe jî bê rehmtir bû. Tîmûr di sala 1405 an de mir, Qere Yûsûf bi alîkariya begê Bedlîs Şerefettîn, di sala 1408 an de dîsa dewlet avakir. (l01l97) Ew qala damezirandina Beraniyan yên li Kurdistanê dike. Jêderên din jî dibêjin di dema Moxolan de ew ji rojhilat hatin. Rojhilat jî bê guman coğrafya navenda Xorasan e.

Di dema hukumdarê Ilhaniyan Argun Xan (1284-1292) de, qebîleyên ji rojhilatê Iranê, Turkistanê hatin li Tebriz, Mûsil, Hemedan û Bakûrê Kurdistanê bi cîh bûn. Navê komê Yîva bû; ji serokê wan re jî Berçem digotin. Prof. Sumer; êlên ji rojhilat hatin Kurdistanê bi yên vir ve merivtiya xwe hebûn; pismamên Şadiyan bûn, dibêje. Damezinerê vê begligê Bayram Hoce û xwarziyê xwe Qere Mehmed bû.,39) Ez jî vê dîtine rast dibînim, lewra: Yîva federasyoneka Kurd û şaxekî Şadiyan bû. Gorî Torî jî, ji Tirkmenistanê hatin

û li newalên li bakûrê Diclê û Firat bi cîh bûn; koçber bûn. Havînan diçun Aladaxê, zivistanan jî diçûn Amed û dora Firatê. Di sala 1380 an de Qere Mehmûd derbasî serokatiya eşîrete bû. (5ö) Uzûnçarşili jî wek êl destnîşan dike, lê ew ji êlekê zêdetir in. Herr kêm federasyon e. Bi dîtina wî, Beranî ji ber Moxolan û ji Maveraûnnehîr û Xorasanê reviyane rojava. Pezreş û Pezgewr li bakûrê Dicle û Firat bi cîh bûne. Pezreş koçber bûne, havînê li Aladax zivistanê jî li dora Firat û Amedê bûne. (31)

Li ser vê xanedanê jî belge kêm in û yen hene jî di destê Tirkan de ne. Wekî dîroknûs dinivîsîn: heta nûka ti kîtabeyên berî kralê Beranî ya Cîhan Şah de nînin. Lê belge û perên bi navê Qere Yûsûf gelek in.1'10'1* Sumer, ji A. Nîşabûrî radigihîne: ku Beranî bi erîşa Moxolan re, di peşengiya serokê xwe Tûre Beg de hatin bakûrê Kurdistanê û xanedana wan hemû Şîa bûn. (110‘7) Çiqas girêdana vî Tûre bi Tûre yê ku Fîrdewsî qal dike ve heye nayê zanîn; lê Mumkune ku ew kevneşopiya wî navî ye. Yekê jî Şîa bûna wan girînge, lewra ji ber wê bi birayên xwe yen din re gelek salan û sedsalan tekoşiyane. Lê wekî xuyadike, li ser hatina wî jêder ne yek deng in û bi hev re di nav nakokiyan de ne.

Wekî hemû gelan, Beraniyan jî ji lewazbûna Moxolan sûd wergirtin. Wekî nivîskar dibêje: împaratoriya ilham di navbera şere emîran de hate par-çekirin; ji wê Tirkmenên Beranî fêde dit. Ew hêza xwe zêde kirin û di navbera Erzirûm û Mûsilê de bûn desthilatdar. Paşe ew desthilatdarî hetanî Sîstanê dirêj kirin. (13,"168) Ew belavbûna jî dide xuyakirin, ku dûmahiyê Beranî li wan der an ma ne yan jî ew coğrafya ji wan re nas bû.

Beraniyan, ji bo ku di xizmeta xwe de bi kar bînin, ji êlên Kurd 50.000 mal gîhandin hev û navê wan "Qere Ûlûs-Zendê Reş" danîn. Ew sifatê reş; i^ê wanî qewmî û bi rewsa wan ê siyasî re girêdabû. Yanî, bi zanyarî dibêjin û ew pir xwezayî bû. Reş-Ulûs wê demê li Iraqê dijîn. Gor Ebû Bekr Tihranî, Cîhan Şah lawê xwe Pîr Bûdak hîn ji walîtiya Bexda navêtibû, Reş-Zend ajotin Ezerbeycanê. (ll0 32) N. Seven dibêje: Beraniyan ji bo ku di xizmeta xwe de bi- karbînin, ji Kurdên Tirk hêzeka ji 50 hezarî pêkanîn û ji wan re digotin "Qere Ulûs". (L50"202) Ew îddeayên eceb hemû ji nivîskarên Tirk tên; çawa Kurdên Tirk? Gelo mentalîta di vir de tê fêhmkirin? Lê gotina Qere Ûlûs ji bo me girînge; mi- rov dikare bi kurdî bibêje Zendê Reş, yan jî federasyona Reş. Xelkekî bi vî navî di dema Medan de li Xorasan dijî û ji Medan re alîkarî kiribûn. Gereg ew kalên Reşî

yen îro bin. Pişti Beraniyan, Reş belavbûn ew hêza jî ji holê rabû. Hinek ji wana li Anadolê hinek jî li Iranê jiyan û navê xwe demeka dirêj parastin. (150~2tl2) Uzûnçarşili jî li ser vê agahî dide û dibêje: di nav leşkeren Pezreş û Pezgewran de leşkeren bf navê "Çerîk" hebûn û ew ji êlan dihatin holê û serhejmara wan ji leşkeren din zêdetir bû. (3I) Yanî eskerên ji êla hatibûn berhevkirin ji yen din zêdetirbûne û ew jî derdixe holê, ku ew herdû konfederasyonên Kurd bûn.

Dema Beranî bi hêz bûn Mûsil dagir kirin, di vê dagirkirinê de em di¬binin ku gelek beg û begebegên Kurdan di navê de bûne. Serokê Beraniyan

Bayram Xoce di sala 1371 an de Mûsil dorpêç kir; di wê hewldanê de eskerên Heskîfê jî hatibûn alikariyê. Ji serokatiya Xoce bigre hetanî dawiya mîmîşîne, emîrên Heskîf, Cizîr, Bedlîs, Zirkî, Silêmanî û Kurdên din bi Beraniyan re girêdayî man. (UM2) El û zendên ku Beranî pêk dianîn di alî olî de nêzîkî hev- bûn û hemû jî Kurd bûn; li ser vê baweriyê, evv di şer de pir jêhatî û serkeftî bûn. Mînaka vê jî têk birine wana ya Tîmûr e, ku dewletên mezin nedikaribûn li ber wî ravvestin û Beraniyan egîtiya Kurdan nîşanî wî jî dan.

Tîmûr di sala 1386 an de rojavayê îranê girt, serê salê li Qerebaxê bi amadekariyan örîşa ser Beraniyen derbas kir. Gor jêderên Ermenî, Ereb û yen din, Beraniyan mêraniyeke pir mezin nîşan dan û di vî şerî de Tîmûr têk bi¬rin. Bi alîkariya Kurdên ji çiyan daketibûn Qere Mehmed, Tîmûr têk bir; gor Ermeniyê bi navê M. Torna, Beraniyekî bi navê Marûf bi tenê serê 100 Çaxatayî jêkiribû (1387). Di heman salê de Mintaş li hember Siltan Berkûk serî hilda û Qere Memed bi Qadî Bûrhaneddîn ve jî alîkariya wî kirin. (UU'50) Wekî di vê bûyerê de jî xuya dike, mirîtî û êlên Kurdan pir caran bi hevre alîkarî kirine. Vê demê mirov dikare bipirse, gelo hêza Beraniyan ji kîjan êl û zendê dihat?

F. Sumer dibêje: Ew Ulûsê-konfederasyonan ji boy-federasyonên mîna Şadî, Baharlû (texmîn dikim ew Hewêdî ne-Ş), Alpaxût, Dûharlû, Axaç-Erî, Hecîlû, Qeremanlû û Çekûrlû pêk dihat. (131'16B) Mirov dema li wê konsesûsê dinêre, xuyadike ku ew beşa hêzên Kurd berê dewlet, mirîtî û beglig damezi- randin bi piranî yan nêzîkî hev kar kirine yan jî ew ji hev hayîdar bûne. Nêzîk- bûn û hevkariya wan jî girêdayî dijminan e, dema dijber mezintir, dijwartir û bi hêztir dibin, Kurd jî mecbûrî yekîtiyeka mezintir pêk tînin. Beranî jî encama vê pêdiviyê ye. F. Sumer dibêje: Federasyona êlên Yîva bi Beraniyan vê xismên hev in; ji bo vê gelek îşaret hene. Berî ûrîşân Moxolan, di bin serokatiya boy beyî Berçem de, ew li Hemedanê dijîn. Ya din; Şadiyen li Nahçiwanê (warê wan ê kevn) pismamê Beraniyan in. Ya sêyemîn jî; di dema tofana Moxolan de, beşek ji Yîva li cîhên xwe yê zivistanê Mûsil û Kerkûkê bûn. (1KM4) Tiştekî din ku em li wan dîtinan zêde bikin nîne. Ew bi serê xwe îspate, ku Beranî Kurd in. Lê êlên Yîva min tam dernexist ku kîjan in; gor texmîna min, ji Reşiyan û Şûxbizinan yek e.

Ûzûncarşili dibêje Beranî konfederasyoneka Kurd û Tirkmenan bû. (31) Ez bawer dikim, mebesta nivîskarê bi Kurdan, êlên yan Di milî yan jî Lerî ne; dibe ku Kurdên li Kurdistanê bin jî; Tirkmen jî Kurdên koçber in. Gor wî: Êlên mîna Çakirlû û Ayinlû endamê Beraniyan in. Dîsa êlên mîna Silêmanî, Zirkî, Mehmûdî jî bi Beraniyan re girêdayî bûn. Zirkî li bakûr û bakûnê rojhi- latê Sêrtê dijîn. Şilemanî jî H Xerzan û İTeskîf ê dijîn. Mehmûdî jî li Wanê bûn. Beren Beraniyan ya herî mezin Baharli bû û serokê xwe jî Memedê Reş bû. Memed, hukumdarê Amedê Osmanê Reş yê ku girêdayî Tîmûr bû di şer de têk dibe. Di sala 1468 an de dawî li hukumdariya wî tê.<31) A. Özer jî dibêje: Di nav Beraniyan de qebîleyên wek: Şadî, Duharî, Qeremanî, Çakirî, Bahar, AT pagût, Ayûnlû, Axaçerî, FFecîlû, Doger, Bayramî, Silêmanî, Zirkî û Mehmûdî

hene. (7H) Li ser Şadî, Qeremaniyan de me agahı dan, ku kîjan êl girêdayî wan bûn. Dogerê nêzîkî Têrikî y a ne. Ew êlên ku di bin sîwana Beraniyan de îro bi piranî li navenda Anadolê û Xorasanê dijîn. Gorî Abdullah Varli radigihîne, em dibinin ku ew serokên hanê jî bi Beraniyan re bûne: Serokê îmade, Siltan Ehmed, Bîrecîkê-Ristem Fexreddîn, Hezo-Şah Eli, Serokê leşkere Sor (Sûor- sûr) Huseyn, Sîncarê-Huseynê Xelîl, Tilefer-Xelîl, Suhrab, Mûsil, Erwaqiye.f23) Di van şerten îro de ez nikarim hemû êlên di nava Beraniyan de ji sedî sed diyar bikim, lê piraniya wan eşkere dibe ku kalên Kurdên îro li dervayê welat in. Ew îşareta parçebûna Kurdên li dervayê welat li ser bingeha olî jî dide û yen misilmantî pejirandibûn di bin sîwana Pezgewran de, yen li ser ola Zerdeştî- Sersortî jî di bin sîwana Beraniyan de xwe bi rêxistin kiribûn. Ji bo wê em dikarin qetî bibêjin ku Kurdên îro li Anatoliya Navîn berê li ser ola Zerdeştî bûn û Beranî pêk dianîn.

Dema Pez-Reş belav bûn, êlên ku nexwestin têkevin bin desthilatdariya Pezgewran, beşek jê çû Xorasan û ketin bin desthilatdariya Tîmûr û beşekî jî berbi rojava koç kir.<39) Yen din jî ji neçarî xwe avêtin hembêza Pezgewran. Bi hilweşîna Beraniyan re Baharlû yê girêdayî wan serî ji Pezgewran re ne- tewandin û çûn Xorasanê. Ji wir jî hinek çûn Hindîstanê. Ji wan Siltan Kûlû Golkone (Dekkan) di sala 1512 an de dewleta Kûtûp-Şahiyan damezirandT31' iss» pirsgirêka din di tespîta wan de jî nav in. Ji bo ku Osmaniyan navên êlan kirine tirkî, wek mînaka Baharlûya li jor, em tam nizanin ku ew kîjan êl in. Lê wexta em li êlên cara yekemin çûbûn Xorasan û Hindîstanê dinêrin û ji bo ku serî netewandina Hewêdiyan jî dizanin, dikarin bêjin ku ew şaxelcî Şadiyan û Hewêdî bin. Ihtîmala Berazî bûna wan jî heye.

V. Mînorskî dibêje: Beranî di navbera êlên Kurd de bûn sedema tev-lîheviya olî û siyasî. Raste, lê sedema vê yekê ne Beranî ne; sedema vê

empery- alîzma Island va bi darê zorê dixwest dînê Kurdan biguhureye. Bê guman ew di nava Kurdan de bû sedema gelek şer, xwînrijandinê, parçebûn û bindestiyê. Li hember van jî, Kurdên bûn misilman di bin sîwana Pezgewran de kom bûn, ku navenda xwe li Amedê bû. Siya seta wan jî li ser ji hole rakirina komên Kurdên mezin bû ku bi balkeşî û dîqet dom kirin. Bi taybetî jî, êlên têkiliyê xwe bi Beraniyan re baş (Çemîşgezek) bi dijwarî ceza dikirim

Avcioglû dibêje: Ola Beraniyan "Ehlî Heq" bû; ev sedema girîng jî tevhev bûyinê hêsantir dikir û bû sedema gelek êlên Kurd bibin Turkmen. Ji bo vê Kurdên Çakirlû yen ji Erdebîlê dirêje Mûganê dibin û Hinûslû yên çûbûn îranê di sedsala XV an de bi tevahî bûn Tirk. Dîsa 24 êlên mîna Arapgîr, Çemîşgezek, Amarlû di dema Sefawiyan de li Ezerbeycanê, Qerebaxê diji- yan bûne Tirk. (W) Bê guman hinek êlên Kurd bûn Tirk; di serî de jî Qereçorî; heta mumkune xeyalî be lê bi dîtina min Azeriyên îro (ewe fizîka xwe mîna Kurdan) ew Kürdana ne. Elên din ên ku nivîskar dibêje, nebûn Tirk. Nivîskar ferqa Kurd û Tirkmenan jî nabîne; yanê Tirkmen Kurd bixw7e ne. Piraniya wan êlên ku tên qal kirin min çûn dîtin û hîna jî Kurd in. Ji zimanê kurdîbêtir hema

hema ti zimanên din jî nizanin. Amarlû li Gîlanê ne, yen din jî li Xorasanê ne. Li ser ola Beraniyan Uzûnçarşili dibêje, mezheba wan Şîatî bû, heta Batını bûn û ji ber vê hindê Memlûkî û Pêzgewr li dijî Beraniyan bûn. (31>

Li ser perê İlhanı, Celayîrî û Eretna de, cîhe ku le çêdibin (darpxane) jî navê xwe Beran e. (llü l8) Gelek balkeşe! Ew dewleteke bi hêz û kudret bûye ku pere derxistine, lê pêdivî hîn zêde bi lêkolînan heye. Li Bediîse 9 sîkkeyên bi nave Qere Yûsûf û Pîr Bûdak hîna jî hene. (150'2n2) Li ser perê Beraniyan Kelîmeî Şahadet û navê Çihar-yar î heye-Mecalis-ûl-Mûminîn. (31) Ew jî bi min zêde rast nayê.

Wekî min li destpêkê jî göte, Tirk îddea dikin ku Beranî Tirk in. Lêkolînerê dîroka wan F. Sumer, êlên Beraniyan dike du beş, wTerin em tevhev Tirkbûna wan bibînin?!

Êlên Beraniyan

a- Qara Koyûnlû (Beranî): Di sedsala XV û XVI de li Anadolê gelek êlên bi vî navî hebûn; wek Qaraca Koyûnlû û Qara Koyûnlû. Ji wana ya daw'î di dema Kanûnî de, di nav Tirkmenên Helebê de dijînd110 20> Tirkmenên Helebê kalên Reşiyen îro ne! Şaxekî wan jî li Yenî II (Yozgat) diçû zozanan. Di dema Mûratê III an de, ew li Qeremanê bi cîh bûn. Ew di nava Tirkmenên Helebê de 500 kon bûn. Li Amedê di nava Boz Ûlûs de bûn.<110'20) Ew jî Têrikî ne. Di dema Kanûnî de şaxe herî mezin li başûre Eskîşehîre, li herêma Seyid Gazî bûn. Di sala 1572 an de ew 18 êl bûn û nifûsa bacê 1116 kes bûn, ku texmînî nifûsa wan

6- 7 hezar in. Li Ezerbeycanê jî dûmahiyên xwe hene. (llû'2ü) Ji vê derdikeve ku bingeha Beraniyan êla Têrikî ye. Di hinek jêderan de jî Tirkan derbas dibe; lê di Kurdbûna wan de guman nîne.

b- Şadı: Jêderên Iranî dibêjin kürden Şadî pismamên hukumdarên Beranî ne. Ji berê ve li Nahçiwran û Korta Şadî (Çûkûrî Şad-Sûrmelî) de dijîn. Piştre hatiye nivîsîn ku Şadî, ji êlên Beraniyan pêk tên, ji yen herî bi hêz a duyemîn e. Ji hilweşandina Beraniya bi şûnde, ew ber ketin xizmeta Pezgewran, paçê jî bûn hevalên Sefawûyan. (lin 22) Me di beşa Şadiyan de jî qal kiribû ku di Kurdbûna wan de jî guman nîne.

c- Bahar-lû: Yek ji êla bingehîn a Beraniyan e. Mînorskî dibêje ew ji Hemedanê hatin. Ji hilweşandina Beranî ya bi şûnde, ew nexwestin tevlî Pezgewran bibin û çûn Xorasanê. Li wir ketin bin sîwana Tîmûr û tevlî nakokiyên Tîmûriyan bûn. Ji mirina Hesenê Dirêj îstîfade kirin, di sala 1479 an de, bi rêya Sîstar^û Bamê, Kirmana Pezgewran dagir kirin. Paşe

Siltan Yakûb ew têk birin û çûn Curcan. Ji wir şûnde li Xorasan man û beşek jê tevlî seferê Babûr ê Hindîstanêbû. Li sedsala XVI an li Dekkanê dewleta Kutbşahîava kirin. Baharlûyên îro li rojavayê Qazwînê li Hamse dijîn.<110'25) Ewr êla min tam nikarî derxim, lê gor texmîna min êla Hewêdî ne. Dibe ku Lek yan jî êlên Hewraman bin, lew'ra li wê herêma tê gotin ew dijîn. Li bakûrê wran Kurmancên Amarlû,

li rojavayê wan jî Kurmancên Celikî dijîn. Yanê kîjan dibe bila bibe ew hemû jî Kurd in.

ç- Tokarlû (Dûharlû): Berê li dora Erzirûm û Baybûrtê dijîn. Serokê wê êlê di şerekî bi kralê Trabzonê de mir. Ji Pezgewran Tûr Elî heyfa wî heyna. Di dema Qere Yûsûf de serokê vê êlê Pîr Ahmet Beg bû. (110'26) Ew kî ne nizanim, lê divê Kurd bin.

d- Qereman: Vê êla navê xwe ji serokê Gêncê û Berda Emîr Qereman girt. Di dema Qere Yûsûf te E. Qereman begê began bû. Di gelek belgeyan de jê re "Reş/Kara" tê gotin. Dİ avabûna Sefawiyan de roleka mezin lîstin. Di dema Şah Ebbas de, bi Ustacalû yan re hate girêdan ku ew yek ji heft êlên Ser- soran bû.,U0-27) Di Kurdbûna wan de jî guman nînin. Wekî me gotibû Ûstacalû jî serokên koma Layîniya ne û niha li Xorasanê dijîn, Kurd in.

e-Alpaxût (Alpavût): Wate nav; ewbi tenê êrî§î dijmin dike ye. Di dema Yûsûf de Elemedanê di destê wan de ye. Piştî Beraniyan tevlî Pezgewran bûn. Ji serokên mezin yek jî Pîr Mehmed Alpavût Beg bû. Di dema Sefawiyan de em dibinin ku ew li Şîrwan, Korta-Şad û Berda dijîne. Di dema Şah Ebbas de ew li sencexa Şîrwanû bûn. (,10'28) Kurd in.

ê- Çakîrlû (Çekîrlû): Navê xwe, ji serok Emîr Çakirê di dema Celayîran de jiyayî girtine. Wexta Tîmûr Iran heyna kete xizmeta wî. Ji berê ve li Erdebîlê war girtibûn. Di dema Pezgewran de jî xwe parastin. Ibn Arabşah

(Acaîp ul- makdûr-Qehîre) dibêje ew Kurd in. (U0~29) Di wir de jî şüphe tune, f- Ayînlû: Li dora Amedê jiyan û ew Kurd in. (UÜ 30) g- Hecîlû: Ihtîmalê ku ew şaxekî Dogeran bin. Lewra êla Hecîlû li Kerkük û Hewlêr dijîn û beşekî Dogeran jî li wir war girtibûn. (110‘30)

h- Axaç-erî: Di sedsala XIII de li Mereçê di daristanê de dijîn ew tê zanîn. îro 2000 mal li Kûh-Gilûye li îranê dijîn. (1,0"31)

i- Doger: Ew raste rast tevlî Beraniyan nebûn; li Sûriyê rêxistineka siyasî ya cüda avakiribûn û alîgirên Beraniyan bûn. (110"31)

î- Bayramlû: Navê xwe ji Bayram Begê ku bajarê Xoy di dest de bû wer-girtin. Nivîskar ji bo wana dibêje ew Tirk in; lê ti têkiliya wan ji nêzîk û dur ve bi Tirkan re nîne û hemû Kurd in. Nivîskar êlên li jêr jî wek Kurd nîşan dide: j- Elên Kurdên girêdayî Beraniyan: Ji bilî êlên Tirk, di nava Beraniyan de yên Kurd jî hebûn. Vana: Silêmanî, Zerikî û Mehmûdî û yên din bûn. Qere Mehmed, Kurd li dora xwe komkirin û li hember Tîmûr şer kir. (110'32) Ew jî êlên Kurd en bi nav û deng in. Zerikî li Enqerê, Sêwas, Semsûrê û Xorasanê hene. Wekî hate xuyakirin ti têkiliya Beraniyan bi Tirkan re nîne; heta ti êlên Tirk jî di navê de nînin. Ew konfederasyon/ dewleteka ji êlên Kurdên ola xwe jî Zerdeştî û 3brsortî ye.

Di nav Beraniyan de rêberê herî bi nav û deng Yûsûf Beg bû; di serde- ma wî de Beraniyan li Kurdistanê, Iraqê, bakûrê Iranê û welatên din gelek cîh girtin. Destpêk weqas serkeftî bû ku gelek dewlet jê ditirsiyan, lê dawiya wî jî mixabin pir bi xemgînî hat! Yûsûf Beg ûrîşî ser Moxolên İİ Siltaniyê kir, Ebû-

Bekirê Çaxatay vekişî çiyayê Demawend. Di nava serleşkeıûn Ebû-Bekîr de kesekî bi navê Newruz jî heye ku balkeşe. Di sala 1408 an de, 20 hezar leşkeren Beranî wiha rêz dibûn: Li navendê Qere Yûsûf, mile çepê Huseyn Begê Şadî, mile rastê Emîr Bîstam (serokê êla Çakirlû ya li Gîlan) bû. Bi

mêraniya Qere Yûsûf bi xwe, Çaxatay-Ebû Bekir belav bûn. Ji bo mêranî ya Yûsûf ev helbesta heye:

Dilawer Qere Yûsûfê namdar Der Amed be heyca çû Isfendiyar Nîşete ber esbî kûh-î revan Ber averde ez cism-î sad kes rêvan. (11(l'75)

Dîsa tê zanîn ku Yûsûf gotibû: Dilê min di text de nine, em gelê Turk¬men (Kurd) dixwazin havînan herin Aladax, zivistanan jî herin dora Firat. Belkî sedema belavbûnê û nebûna xwedî dewleteka mayînde jî ew mentalîte ye. Yanî bi azadî û serbesti di nava çiyayên xwe de jiyan. Yek sedem jî; şere navxvveyî bû. Bi birayên xwe Kurd yen jê re Pezgewr tê gotin re herdem di nav şer û tekoşîne de bûn.

Di sala 1417 an de Qere Yûsûf bi xwe çû ser Qere Yûlûkê Pezgewran. Jêderên Misir wiha dinivîsînin: "Di heman salê de hukumdarê Memlûk Melîk Mehmûdî çû ser Meletiyê. Lewra Meletî, Darende, Besnî, Kolik û Gerger ketibû destên serokên Kurd. Memlûkan dix west dîsa bikin bin destên xwe. Mehmûdî, Kolik dorpêç kir û bihîst ku Qere Yûsûf, Yûlûk têk biriye. Bi ser vê de waliyê Helebê Koçkarê ku Gerger dorpêç kirî tirsiya û reviya. (llü 97) Dewleta Pezgewr di sala 1403 an de li Amedê hatibû avakirin; karê wan ê destpêkê jî ârîşa ser Kurdên bi Beraniyan re tekîldar bû. Ji bo wê dora Amed û Çêrmûkê şewitand û gelê Çêrmûkê qir kirin. Di navbera Kurd û Tirkmenan de cûdatiya mezhebî hebû; Tirkmen şû (Elewî) bûn. Mirov dikare wiha jî bêje: Kurdên koçberên ku ji rojhilat hatibim elewi bûn û Kurdên nişteclh jî sunnî bûn û di wê demê de em şere herdûyan dibînin. Hukumdarê Pezgewran Uzûn Hesen ji bo ku mîrîtiyên Kurdan ji holê rake, gelek sedem didîtin û Kurd bi Kurdan dida kuştin. Di vî karî de pir bi hostatî dixebitî. Kurd di destê xwe de kiribûn lîstik û çawa dixwest wiha dikir. Wek mînak: êla Çemîşgezek bi fêleka pir hêsan li hemberî êla cîran derdixist û bi hev dida kuştin. Serbazê Hesen Sofî Xelîl û Arap Şah êlên Çemîşgezekâ xapandin û ajot ser êla Botan. Di navbera

wan û êlên Dumelî û Dembillî de şeren bi xwîn derketin(19) Di sala 1416 an da Meletî, Darende, Besnî kete destê Tirkmenan. Gerger û Kahta jî dîsa ketin destê Kurdan. Di heman demê da Qere Yûlûkê Pezgewran, aliyê Mêrdînê talan kir 8 qele girtin û gelê 220 gundan koçberî aliyê xwe kir. Keçik birin bazaran bi 2 dîrfteman firotin. Qere Yûsûf derkete dû wî, ew' jî reviya Helebê. Bi ser vê de Qadî yê çar mezheban û xelîfe fetwa dan ku bi vî "Kafiri!" re şer wrezîfe ye. Bi vê re êlên mîna Inallû, Bayat û Avşar ku welatê Beraniyan talan kiribûn warê xwe cî hîştin û reviyan Tarablûsê.ai0'99) Wekî di wê fetwayê de jî xuya dike, Pezgewran hêza misilmanan jî dane pişt xwe û erîşî gund û bajarên

Beranî-Woods-1451

Trabzon

Kurden Sersor dikin. Li vê demê jî durûtiya misilmanan eşkere dibe; ewên jin û zarokan direvînin li gorî wan ne kafir in, lê ewên ku wana diparêzin kafir in, lewra ola wan cüda ye. Ew jî sînorên kûr di nava gêlê Kurd û miletên cîran de derdixe holê.

Qere Yûsûf amadekariya şere bi Şah Ruh re dikir ku li dora Tebrîzê di sala 1420 an de mir; bi ser vê de Ahmedê Qeremanî û kurên xwe çûn dora Gêncê. Hinek jêder dibêjin kurê Yûsûf jî çûye.<n(M09> Gerokên Memlûk û Tîmûrî dibêjin: ew mirovekî dirêj, navpî pahn bûye û bi 40 jinan re zewicî û her yek jê di qesrekê de bûye. Dibêjin têkiliya wî bi ol re jî tunebûye. Yên mîna Ibn Hacer jî dibêjin ew zindiq bû. (1,0 ,I4) Kurd êdî wata wan gotinan dizanin, yên ku ola xwe dişopandin û tevlî misilmanan nedibûn re her gotin serbest bû.

Piştî mirina Yûsûf em dibînin ku ji alîgirên wî yê herî mezin Şadî, li Nahçivan û Surmeliyê ne. Di vê demê de Çaxatay dîsa a^şeke dişîne ser wan. Di heman demê de Boybegê Qereman li dora Gêncê-Berda erîşî tehsîldarên Çaxatay dike; Şah Ruh dîsa esker şandin ser wan. Di 1421 an de dîsa artûşa Şah Ruh û Beraniyan hate hember hev. Beranî di binê fermandariya kurên Yûsûf,

A A

Ispend u İskender de bûn. Dîsa li milê rastê, serokê êla Şadî Pîr Huseyn, birayê xwe û serokê Alpagûtan Korkan û Sorkan hebûn. Li milê çêpe jî Ispend Mîrza hebû. Artûşa Beraniyan 30-40, ya Çaxatayan jî 200 hezar bû. Bi rojan şer kirin lê di dawî de Beraniyan şer winda kir. (1I(M21)

Cîhanşah îcaze da leşkeıûn xwe, ew şandin malên wan. Bi xwe û lawên xwe; Muhammedi û Ebu Yûsûf ve li deşta Mûşê ma. Di sala 1467 an de Hesenê Dirêj bi 6000 eskerên xwe ve ji nişkava êrîşî wan kir, hemû kuştin. Hesen bi êlên Beraniyan ve berê rêya lihevhatine bikar anî û Hecîlî bi Alpavûtan ve tevlî wî bûn. (114175) Piştî rêya lihevhatine jî bi şer û komkujiyan xwest wana bîne cem xwe. Bi vî awayî dawî li dewleta Beranî hat. Kurdên di bin sîwana vê dewletê de gihîştibûn hev jî belav bûn. Hinek çûn Xorasanê, hinek berbi rojava û hinek jî tevlî Pezgewrên Kurd bûn.

PEZGEWR

(AQ QOYÛNÎ-BAYINDIRIYE)

Li ser navê wan jî zêde agahî tunin. Lê wekî xuyadike, di navê wan de jî dijberiya Beraniyan xuya dike. Çawa ji bo Beraniyan navê Qerekoyûn- lû-Pezreşan bikar anîne, ji bo Kurdên din ên misilmantî pejirandî jî ber êqsê wê Pezgewr bi kar anîne. Xwestine bi nav jî, beşekî Kurdan wek pisîka reş ê bê oxûr; beşekî jî spî, paqij û helal nîşan bidin. Di vê navkirinê de jî mirov cûdaxwaziya olî û siyasî dibîne. Doç. Irahîm Yilmazçelîk wiha şirove dike:

Li Ovacika-Dêrsîmê êleka bi navê Pezkel (Pekevran)=Topuzlu heye ku navê Pezgewran tîne bîra mirov. Êlên li Dêrsîmê di dema Hesenê Dirêj de li Amedê dijîn û wexta Tîmûr hate Anadolê ew jî çûn Dêrsîmê. (116'105) Bi dîtina min jî ew şirove raste, lewra tê wata ewên ku xwedî pezên kel/şax/siro in. Ji bo ku ew

êlên di vê konfederasyonê de cîh girtibûn jî pez xwedî dikirin û heta demên dawî koçber bûn, mumkune ku navê xwe wek birayên xwe Beranî ji pez wer- girtibin.

Hemû dîroknûs û lêkolînerên Tirk ji bo wan jî dibêjin ew Tirk in. Ew yeka bi nûserên biyanî jî dane pejirandin. Lê bi qasî em didin îspat kirin, ew Kurd in; îhtîmal heye ku hinek rêvebirên xwe yan jî fermandarên xwe Tirk bin, lê bi dîtina min di Kurdbûna wan de ti şik û guman nine. Ew di nivîsandina defterên kevn de jî xuyaye. Memûrên defterên "Osmanli Tahrîr" (defterên nifûsê) herkesên li rojhilat û rojhilatê başûr dijîn wek "Kurd" nivîsîne. Ew yeka hertim tê ber me. Wek mînak di 1520 an de, di belgeyeka sencex û eyala- tan dide xuyakirin de, Tûr Elî Begê Pezgewran yê derbasî xizmeta Osmaniya bûyî jî Kurd nîşan dide.<H8"5ft) Prof. Unal ji vê belge acizî û nerihetiya xwe bi vî awayî eşkere dinivîsîne ku ew jî îspateke, Prof, dîtina dewletê ya fermî nîşan dide û ji belgan re jî hürmet nîşan nade.

Ûzûnçarşili dibêje: Eleka ji Xorasan û Ezerbeycanê di sala 1284 an de hatiye û li 1480 an de li Ezerbeycan, Amed û Xarpûtê hatiye dîtin. (3l) Torî jî dibêje, di salên 1248-1291 an de ji Xorasan hatin Ezerbeycan. Dema hîn êl bûn di navbera Amed, Xarpût û Ezerbeycanê de dijîn. Dewleta Pezgewran ji alî Qere Yolûk Qera Osman ê birayê Begê êlê Ahmet ve hate damezirandin. Di sala 1452 an de jî Hesenê Dirêj (1457-1478) hat rêvebiriyê. (58) Piraniya nûse- ran dibêjin ew ji Xorasan hatin. Dema hatina wan bi hilweçandina dewleta Şadiyan ve nêzîkî hev e. Eger mirov

bibêje dûmahiyên Şadiyane, ne şaş e. Li destpêkê ew wek êlêkê xuya dikin ku piştre êlên din tevlî wan bûne. Vê yekê John E. Woods jî sererast dike: El. Dirêj, hêzên ji êlên mîna Qere Osmanî, Pîr Elî Bayindir, Avşar, Emîrî, Bican, Haydarî, İvaz, Mûsilî, Pûrnak û Koca Hecîlî li dora xwe komkirin û li hember Beraniyan kete tekoşîne. (114 l43) Berî dema Hesen jî ew ji êlêkê zêdetir in. Ew êlên li dora El. Dirêj bi piranî dûmahiyên mîrîtiyane; yanî ewên ku ji federasyon, êlan veqetiyane. Dîtina nêzîkî rastiyê ya F. Sumer e: Pezgewr bi piranî ji du êlên mezin ên mîna: Pûrnek û Mûsilî pêk tên. Pişti wan jî Hamza-Hecî, Qere-Elecî, Emîrî, Îzzeddîn Hecî yan pêk di¬hat. Bi pt'şketina wan re Tirkmenên Helebê (êleka mezin, Kûtbegiyê ji Avşar û ji Bayatan jî beşekî girîng), Dulqadir, Çepnî (Trabzon) jî tevlî wan bûn. (13M70)

Baysanoglû dibêje: Di dema Tûr Alî Beg (1340) de derketin saha dîrokê. Di kitêba wan ê fermi ya bi navê "Kîtab-i Diyarbekriyye" de wiha tê nivîsîn: Pişti Pehlewan Beg êlên Pezgewr li dora Elî kom bûn. Nêzîkî 30.000 malbat bûn. Bi salan li Amedê, ji sînorên Rûm, heta Şam, Misir, Cezaîr, Iraqê serok bû. (138-398) |3i alên wan de sembola miyan hebû, girêdayî totem a pez bûn, bûn misil man şûncfe jî, dest ji vê totemê bernedan. Woods îddea dike, ku dîroka Pezgewran ji Oxûz destpê dike; paşâ Bayindir Xan, Pehlewan Beg, Tûr Alî (1300-1360), Kûtlû .... Maria Komnene (1360-1389), Ahmet (1389-1403), Qere Osman (1406-1435) û berdewam dike.. .bawer dikim jêderên wî jî nûserên Tirk in, lê Oxûz kalên Beranî û Pezgewran herdûyan e.

IC

ûffl

is

>

't

Firehbûna Pezgewran

ispata vê Ebu Tihranî dide; dema Qere Yûsûfê Beranî ji mirina Tîmûr bi şûnde ji zîndana Sûriyê hate Kurdistanê, dixwest xaka xwe ku Tîmûr ji dest girtibû dîsa heyne. Yûsûf: Ji Doxerên (Têrikî, Bexdilî-Ş) li Diyarı Mûdar koç- ber, ji pismamên Dogera yen H Mêrdîn Isa yê Artuqiyên nişteclh, ji Kurdên Zerikî yê Terdi, Farqîn û Cizîrê; ji Silêmanî û Kurdên Botî arteşek ava kir. Wan koman dizanibûn ku ji bo dhên wan ê li Sûriyê û Amedê Qere Osman xetereke mezine. Ji bo wê dixwestin bila Yûsûf erîşî aligirên Tîmûrê Pezgewr bike. 20 rojan bi hevre şer kirin, lê yekî zora yekî nebir. Ebu B. Tihranî ji devê Yûsûf, mektuba ji Qere Osman re hati nivîsî de wiha radigihîne. Yûsûf: "Em herdû ji ji koka Tirkmen in, ji bo vê em hewl nedin ku zora hev bibin, bihevre tekoşîne nekin. Em herdû jî bi dijminê xwe yê li Anadol (mebesta wî Osmanî ne-Ş) û Tîmûrî re mijûl bibin. Ji bo te baştire ku tu erîşî Sûriyê û Anadol bikî; ji bo min jî Çaxatay in". Qere Yûsûf, ji vê peymanê re riayet kir û di salên 1406¬1408 de li hember Çaxatayan du caran biserket û ew ji warê xwe yî qedîm Ezerbeycanê avêtin.'n4 85) Tihranî bi awayekî eşkere ji devê Yûsûfê Beranî vê namê radigihîne; ku ew yekbûna koka wan dide xuyakirin. Lê dema ku ew di nava hevkariyê de ne, pir hindik e; bi piranî bi hevre di nava şer de bûne.

Qere Osman bi Iskendenê Beranî ve li Nisêbînê di sala 1421 an de şer kir. Piştî sê mehan Qere Osman têk çû; Beraniyan û şaxekî Doxeran ew heta Amedê qewitandin. Piştî wî şerî, êla Pûrnek keçika xwe dan Qere Osman û bi wî awayî Pûrnakî di bin serokatiya Kûh Ahmet Beg de tevlî Pezgewran

bûn. (m‘ 9C) Ew zewaca girîng e, lê em nizanin sedema vê çi ye; bê guman vê gelek hêz da Pezgewran û piştî vê jî êdî ew mezin dibin. Ew parçebûn û nakokiyên navbera Kurdan yê vê demê heta roja îro hema hema bi vî rengî jî berdewam dike. Wekî êlêk dijminatiya xwînê ya din bike. Ew rewş di nava laşû Kurdan de bû vîrûsa ketî xwînê...

Yek ji lêkolînerê ku li ser Pezgewran nivîsî Woods e, niqtên balkeş derdixe hole, lê ceserat nake ku derbasî dervayî sînorên Tirkan bibe. Dibêje, di salên 1435 an de di nava coğrafya Islam de, konfederasyoneka êlan ya nîvkoçer bê ehemiyet bû. Paşû ji Heratê heta Qehîrê û Bûrsa navê xwe belav bû. Her çiqas paşmayî be jî, dewleteka bürokratik ya Irani-Misilman bû. (l,4'%)Li gelek cîhan dibêje ew Tirkmen in, lê li wir jî dibêje ewê Tranî-Mûsilman in. Îranîbûna wan Kurdbûna wan e. Dîsa tîne ziman: ku ji artê§a Pezgewran, ji sedî heftê eskerên êlan pêk dihat û şikle artûşa êlan dida. (mi88) Ku bi temamî raste, lewra ew konfederasyona êlên Kurd bû, wek kevneşopiyû, her êl jî di bin fermandarê xwe de eskerên xwe birêve dibirin û di asta jor de jî girêdayî begê zendê yan jî Mîrêmîran bûn.

Hesen^Direj li destpêka dîroka xwe, li hember êlên Kurd riyên aştiyane bi kar dianîn; wek Osmaniyan bi riyên aştiyane, zevac, ol, şantaj û suîkastan xwest Kurdan bikişîne aliyê xwe. Piştî bi hêz bû, riya darê zorê derxist pê§. Bi Kurdên Bûldûkanî, Zerikî û Çemişgezekî re rêyeka aştiyane şopand; lê êlên li Eyûbî-Malikan, Rizagî û Botî re jî darê zorê derxist peş. (U4'189) Ew kîn û dij-

minatiya birayê xwe pir di kûr de ye û mirov ecêp mayı dimine ku Kurd pir hindik hatine guhartin. Di roja îro de jî, wekî wan rojên di dîrokê de pêk ha- tibûn, Kurdên xwedî îdeolojiya olî wek Pezgewran tevdigerin, di îcaza dijmin de ne û zirarekê mezin didin dîroka miletê Kurd. Wekî dîrok ji nû ve dibe... Ew hişkbûn û kîn di navbera Beranî û Pezgewran de jî xuya dike. Lê Beranî hîn hembezkar û aştîxwaz in; ber eqsê wan Pezgewr hîn

zêde zalim û xwînrij bûne, ku tim dixwestine mîrîtiyên Beraniyan ji holê rakin.

Hesenê Dirêj

Berovajiya Beraniyan, Pezgewran mîrîtiyên Kurdan ji holê radikirin; ew ne ji bo nijad e; sedemê vê mezheb bûye. Her çiqas Ehl-î Heq ne ola Beranî ya fermî bûye jî, ji vê olê re toleranseka mezin hebûye. Ji bo vê Prof Sumer dibêje: ola wan ê fermî ne Şîa bû, lê ew jê re germ û bi sempati bûn. Wexta desthilatdarê Bexda Esfehan Mîrza mir, ew li ser navê 12 îmaman xutbe xwendin û sikke derxistin. Di vî warî da Mînorskî viha dibêje: Şîayen fundemantelist ji 12 îmaman hezdikirin li Ezerbeycan, Anadola Navîn, Mûsil, Dîlok, Loristan (welatê Goran) ê belav bûn. Waîzciyê "Ehl-î Heq" bandora xwe li ser wan dikir. Ev bawerî ji dema Beraniyan tê...

Hesenê Dirêj di sala 1470 an de Xorasan heyna û Yadîgar Mîrza wek Hukumdaftayîne wir kir. Pîştî salekê Siltan Huseyn Baykara bû serokê Xorasan û Hesen bi wî re peymana aştiye îmze kir û dev ji heynana wir berda. Piştî ew alî çareser kir vegeriya aliyê Sûriye, lê bi serneket. Fetîhkirina dora Bedlîsê ji dabû Silêman Begê kurê Bîçen. (l38 427) Bîçeran li Xorasanê hene û nêzîkî Sêvika- Reşiyan xuya dikin.

Beysanoglû dibêje êlên ku Pezgewran pêktînin ev in: Pûrnek, Mûsilî, Koca Hecî, Hamza Hecî, Tabanî, Ahmetî, Izzeddîn Hecî, Haydarı, Emîrlû, Yurtçu

ne. (,38'397) Li ser vê babete îddeayên cûda hene. Lê Bayindir, Mûsilî û Pûrnek komên xwe sereke ne. Yen di dereca duyemîn de jî ev in: Şexan, Silêman Hecî, Çavûndûr, Dodûrga, Doger, Karkin, Avşar, Bexdîlî ne. Wana bi ser dagirkirina Moxalan de, di dawiya sedsala XIII an ji Xorasanê hatine Ezerbeycan û di dawiya sedsala XTV an de jî, hatin dora Elezîz û Amedê û bi taybet dora Erxaniyê bi cîh bûn. Bi belavbûna dewleta Beraniyan re, ji wan gelek çûn Iranê û li wir bi war bûn. (138_397) Yen çûbûn Iranê di avakirina dewleta Safewî de cîh girtin. Di serdema Sefawiyan û piştî wan jî hebûna xwe parastin. Yen li Anadolê mabûn jî jiyana xwe dîsa bihevre berdewam kirin û di belgeyên Osmanî de ji wan re "Boz Ûlûs" dihate gotin. Ji sê milan pêk dihatin: Pezgewrên esil yan jî mile esas, Tirkmenên Helebê û Dulqadir in. Boz Ulûs ji ber aloziyên siyasî di destpêka sedsala XVIT an de (1022/1607) koçî Anatoliya Navîn kir. Ji wan pir hindik li Amedê man û ji wan re "Boz Ulûs Mandesî- bakiye" dihate gotin.,138'397) Boz Ulûs gelek caran cûda tê şirovekirin; gor demê naverok yan jî êlên girêdayî têne guhartin. Mumkune ku ew îddea jî rast be. Lê di demên din de jî ew cûda ne. Boz Ulûs bi piranî ji bo êlên mîna Têrikî û Zerikî tê bi kar anîn. Lê dema hatin Anadolê Canbeg û yen din jî di navê de ne. Tirkmenên Helebê jî bi piranî Reşî ne.

Ahmet Ozer, ji Arvasî radigihîne ku; di nava Pezgewran de êlên mîna: Bayindir, Pûrnek, Mûsilî, Hamzahacî û Gedîn Hecî yî hene. (78)

Woods êlên Konfederasyona Pezgewran wiha şirove dike:

1. Avşar: Di sedsala XIV an de li bakûrê rojavayê Sûriyê em rastî wan tên. Li wir beşekî Tirkmenên Helebê (Reşî, Sevvêdî...) pêk dianîn. Li destpêkê ji ber waliyê Helebê Cakam û siyaseta wî ya li dijî êlan direvîn; di sala 1407 an de xwe avêtin paş Qere Osman û ji ber wê bi Pezgewran re tên girêdan. Lê xuyaye ku di sala 1418 an de ew vegeriyane welatê xwe yê 1İ Sûriyêl114'3251 Dema min unîversîte dixw'end ji vê êlê hevalê min

Mehmet Avşar hebû, bi xwe ji gundê Deşta Amîkê-Hatayê bû û di her alî de wekî me (Reşî) bû ku di Kurdbûna wan de guman nîne.

2. Bûldûkanî-Mirdêsî: Mirdêsiyê Kurd navça Exîlê ya li bakûrê Amedê kiribûn kontrola xwe. Dewletşah Bûldûkanî bi Qere Osman, Hesenê Dirêj û zavayê wî kurê Hesen Elî re baş debar dikir. Dema Pezgewr li Iranê hilweşiyan Mirdêsî berê, di sala 1504 an de ketin bin destên Dulqadir an; piştî çend salan jî li hember SersdVan ketin tekoşînâ. Piştî Osmaniyan ku di sala 1514 an de Kur¬distan heynan, şaxekî Mirdêsiyan keleha Palûyê heynan û kontrol danîn ser riya Bozûlûs.1114 3301 Li navenda Anadolê û gelek cîhên din hene ku Kurd in.

3. Çakirî-Çakîrî: Bîstam Begê Çakirlû alîgirê Qere Yûsûfê Beranî bû; li hember Tîmûr li Ezerbeycanê şer kir. Serleşkere Beraniyan û serokê

Erdebîl, Kizilaxaç, rojhilatê Ezerbeycan û Mûganê bû. Paşe beşekî mezin tevlî Pezgewran bûn. (,,4 330) Di dema Beraniyan de, Çakirî ji Erdebîlê heta Mûxanê hakim bûn. Gor îbn Arab Şah ew êla Kurd e.°12"2)

4. Meikişî-Çemîşgezekî: Di sala 1456 an de tevlî Pezgewran bûn. Hesenê Dirêj bi keça Suhrab Begê Melkişî re zewicî. Piştre tevlî Sersoran bun. Kurd in.

5. Qeremanî: Di serdema Pezgewran de navê du grûban derbas dibe. Yek: Ji Hesenê Dirêj alîkarî xwestin û xwe avêtin paş wî, ku koma rêvebiran bû. Cara dawîn navê Qasim Begê Qeremanî di sala 1478 an de derbas dibe. Koma duyemîn jî: Li destpêka sedsala XV an de, li Berda-Gêncê bi cîhbûn ku neviyê Emîr Qereman bûn. Piştî belavbûna Beraniyan tevlî Pezgewran bûn. Gara dawî di şere Xoy, sala 1478 an de tên binavkirin. Paçê tevlî Şah Ismaîl bûn. (m 336) Kurd in. Li Xorasanê Kurdên herî xas ew in û hîna jî kevneşopiyen Kurdî dom dikin.

6. Mûsilî: Di milê çepê ya arteşa Pezgewran de êla bingehîn bû. Ji wan Emîr Beg serleşkerî kir. Birayên wî Sûfî Xelîl û Bekîr Beg hatin şandinî Arran- Şakkî û Esterabad. Şaxekî Mûsiliyan li Amed û Armeniyê man û di hejmartina nifûsa sedsala XVT an de di nava Bozûlûs te hatin hejmartin. (114340) Ihtîmale ku Têrikî yan jî Lerî-Şexbizinî bin.

7. Tabanı: Carekê di belgeyên Pezgewran de derbas dibin, di belgeyên Osmaniyan de jî berê li nava Bozûlûs, pa§ê jî li Anatoliya Navîn qeyd bûn. Têrikî van jî Zerikî ne.

8. Dulqadir: Bi piranî bi Pezgewran re şer dikirin, lê carna serokên wan diketin xizmeta reqîban. Beşek di çerê ser Dicle de tevlî Hesenê Dirêj bûn. Beşek tevlî Şah Îsmaîl bûn û Pezgewrên li Iranê rûxandin. Kurd in û beşekî ji wan niha li Gîlanê dijîn. Ew bi serê xwe artêça Rûs dabûn sekinandin û ji Gîlanê avêtibûn der.

9. Zerikî: Kurdên Tercîl, Atak-Hatak, Nûşad, Ayndar li destpêka ber eksê cîranê xwe Mirdêsî li hember Pezgewran heta sala 1446 an şer kirin. Di sala 1446 an de Hesenê Dirêj bi keça Orner Bege Zerikî re zewicî, lê dîsa jî heta 1460 stû xwar nekirin. Di sala 1504 an de Amed ji alî Sersoran ve hate dagir- kirin, Zerikiyan desthiladariya wan hema qebûl kirin.0I4'344> Kurd in. Niha jî li gelek deveran belav dijîn; li sînorê bajarê Eskîşehîre gundekî xwe yê bi navê "Zerika" heye û min ziyaret kiribû. Li derdora Qastamonû, Sêwas, Semsûr û Xorasanê jî hene. Ew êl û federasyona êlan e ku Woods hejmartibûn bi temamî Kurd in, ew îspateke ku Pezgewr jî Kurd in. Lê mumkune ku di rêvebiriya dewletê de miletên din hebin. Lewra di gewherê dewletê de dijminetiyeka Kurdan bi taybet jî yên Sersoran heye. Kaniya vê dijminatiyê dikare dîn be.

Heman nûser diyar dike: ku êlên konfederasyonal hêza esasî ya dewlêta Pezgewran pêk dîanîn. Dewletê ji êlan, ji koçberan û nîvkoçeran dewşîrme digirt, perwerde dikir, meaş dida û ji wan 'Hêzên Hasedsala'

pêk anîn; yanî mîlîsên kral; bi vî awayî balans di navbera êl û dewletê de çêkir.°142ü)

Piraniya nûser û dîrokzanan van êlên li jor girêdayî Pegevvran dest nîşan dikin Ci piraniya wan Kurd in. Di vê de ti şik Ci guman nine. Wisa xuya dike ku êlên Kurd li destpêkê dewletên xwe yen serbixwe avakirine. Piştî şeran û lawazbûnan ew di nava komên mina Beranî de gihîştine hev. Piştî rûxandina wan jî êdî ew hîn zêde parçe dibin. Hinek dikevin nav êlên Pezgewrên sunnî û hinek jî dewleta Safewî ava dikin. Gelek caran jî di nava Osmanî û Pezgewr û Sefawiyan de hatin perçiqandin û belav bûn.

Di destpêka ve beşö de jî min gotibû, li Dêrsîniê hîna jî êla Pezgewran heye. (151"132) Di vê berdewambûna dirêj de jî xuyayê ku ew Kurd in.

Di Serdema Osmaniyan de Ferman û Komkujî

Di serdema Osmaniyan ya duyemîn de, yanî piştî salên 1500 û bi av-abûna dew'leta Sefawiyan re, li Anadol û Kurdistanê gelek nerazîbûn, şer û serhildan derketin hole. Li her demê Osmaniyan ii hember wan serhildanan fermanên komkujiyê derxistine, Kurd kuştine û malê wan talan kirine. Ew yeka bi zimanê tirkî wrek: "Baş kesî, mal yaxmî" yanê seiê wan jêkin, malê wan jİ dest bigrin tê formule kirin. Piraniya ew Kurdên bi wan qetlîaman re rû bi rû mabûn jî Kurdên îro li dervayê u'elat dijîne. Ew Kurdên ji ber zilma Os¬maniyan reviyabûn bi piranî li Arranê kom bûbûn, ku ji wan re Sersor dihate gotin.

Hesenê Direj ê Pezgewran jî, ji wan û tevgera wan ditirsî û bihîstîbû ku li bakurê welatê wî, yanê li Ezerbeycan û Arranê propaganda Şîatiya Rafizî tê kirin. Di nav êlên Tirkmen de ew propaganda dibû ku dewleta Hesen jî li ser hêza wan hatibü avakirin. Ditirsiya ku ewê li dijî dewleta wî ya sunnî derkevin û dijminatiya wî bikin. Wek tedbîra yekemin mezinên wan û

§êxê wan kurê Ibrâhîm Safewî Cüneyt ji welatê xwe avêt. (l3fW16) Hesen di fikarên xwe de maf- dar bû, bi rastî jî ewê li dijî wî û Osmaniyan tekoşîn bidana.

Piştî Şah Ismaîl dewleta Ser soran ava kir û gelek derwêçan li Anadolê di nav êlên Kurd de propagande kirin, hezkiriyen Şah Ismaîl zêde bûn. Wek Pez- gewran, Osmaniyan jî tedbîr werdigirtin. Ji bo ku gelê Kurd li Anadolê neçe alî Şah, yen nêzîkî sînoran koçî cîhê ku nû zept kirî dikirin. Yanî dixwestin Kurdan ji hev veqetînin. Wek Alî Kemal jî tîne ziman: Bi taybetî Elewiyan gelek sempatiya xwe ji Şah re hebûn. Tê gotin Selîm beri ku bi Şah re di nava şer keve, ev mirovên nêzîkî wî hemû dane tespîtkirin û dema çû şer jî ew gelê li ser riya xwe yê Elevvî hemû di şûr re derbas kirin. Ev komkujiya 40 hezar mirovî taybetî li bajarên mina: Qirşehîr, Enqere, Çorum, Yozgat, Meletî, Elezîz, Dêrsîm, Ezingan, û Bîngolê bû. Leşkere xwe çûn ser Baybûrt û Kemahê û bi gelek xenîmet vegeriyan, Selîm, Ferahşah şand ser begê Tercanê yê Sersor û beg Emîr Ahmed dîl girtin. (25) Ewên ji ber reviyabûn jî, çûn çiyayen bilind ên mîna Ezingan, Pu lu mur, Dêrsîm û Bîngolê. Li cihê wan ê vala bûyî jî kesên ku yarmetiya Selîm kirin hatin bi cîh kirin. Dema Selîm nêzîkî Qeyseriyê bû xeber

ji hukumdarê Dulqadiran re şand ku bila bi hezên xwe ve tevlî arteşa Osmanî bibe. Lê hükümdar Alaaddewle vê daxwazê red kir û xwe bê teref îlan kir. Pişti şer Selim ê erîşî wê mîrîtiyê jî bike.

Ji şere Çaldiranê bişunde Yawûz vegeriya Amasyayê û li wir bi 28 mîrên Kurdên ku rêberê xwe Idrîsê Bediîsi bû re civîn çêkir û bi wan re peymanek mohr kir. Ew peymana ji sê bend an pêk dihat:

a-Rêvebiriya mîrîtiyên Kurdan wek berê, bi çand û kevneşopiya wan ê ji bavan ve mayî, ji bavê derbasî lawan bibe û ewa bi vî şiklî berdewam bike.

b-Mîrên Kurd, parazvanên sînorên Kurdistanê ne, lê eger Osmanî bi welatêkî din re bikevin nav şer, Kurd ê bi leşkeren xwe ve herin alîkariyê; Os¬manî jî bi wan re alîkar bin.

c-Mîrên Kurdan her sal bi navê diyarı hinek dirav ê bidin xezîna Osma- niyan. Di vir de tişte balkeş ev ê ku bi nermî terin ser Kurdan, matê wan nas dikin û baca ku Kurd bidin jî wek "dıvarî" hatiye binav kirin ku ew ji Osma- niyan dûr nekevin. Yekî jî 28 mîrên Kurdên beşdarî civîna Osmaniyan bûne, diyare ku yên din ên li dijî Osmaniyan û hevkarê Sefawiyan bûne. Bê guman Şah İsmail jî gelek şaşitî kirin û Kurd avêtin hembêza Osmaniyan. Wekî tê zanîn, 13 mîrên Kurd çûn cem şah û girêciana xwe bi wî re diyar kirin. Lê ji ber sedema fîtneyên hebûn, Şah ew girtin û avêtin zîndanê. Yek ji wana jî serokê eşîreta Heskîfê Emîr Xelîl bû. Ji sê salan zîndanê şûnde rêviya û hat welatê xwe. Di tunebûna wî de, êlên mîna Zerikî, Şervan û yên din ên girêdayî Heskîf, bûn yek û kurê Emîr Xelîl, Silêman anîn ser hukum. Ji wan êlan Reşan, pismamê Emîr Xelîl yek anîn ser text.'58’ Di wê demê de, di nava wan êl û federasyonan de ji bo serokatiya mîrîtiyê pirsgirêk û alozî derdikevin û beşek ji wan êlêna ji mîrîtiyê vediqetin.

Di vê dema şer û aloziyan de Osmaniyan elên bi hêz gor pêdiviya xwe bi cîh dikirin. Piştî şere Çaldiranê yê li sala 1514 an, Idrisî bi alikariya Selîm êla Hayderan û yên bi wan re girêdayî û bûbûn yek, ji bo ku Osmaniyan li sînorên xwe yên nû yê bi Gürcistan, Iranê biparêzin derbasî jorê, Ermenistanê kirin. (17) Ew êlana ji bo ku her tim wek mîlîsan kar bikin ji bacê hatin rizgar kirin. Gorî Lynchê êlên Kurdên li Ermenistan ev in: Zirekî, Cibran, Hesenan, Heyderan, Ademan, Şıpkan û Mamakan in. Hinek dîrokzan, Cemedanli û Celaliyan (Kotan, Soran, Saxan, Hesenan, Keçanan, Dûtkan, Kapdekan û Cinankan) jî tevlî van dikin. Hîna jî êlên Celalî li wê herêmê û bakûrê Kurdistanê hene. Bi dîtina min Saxan jî gereg bibe

Sakan. Lewra di nava Celaliyan de Xelikan li mile çepê; Saka jî li milê raste şer dikirin; ji bo vê ji wan re Saxan tê gotin.

Ş. K. Seferoglû dibêje: Kurmancên li Anatoliya Navîn, ji alî Yawûz Selîm ve, ji şere Çaldiranê yê li 1514 an de bı şûnde hatin şandinî rojhilatê Tirkiyê. Ji van re êlên Tirkmen jî di gotin. Di dawî de vana, di belgeyên Osmaniyan de Aydin, Sarûhan û Kütahya wek nişteclhen "Taîfên Tirkmen" têne nîşandand91' 681 le zanîn ku êlên mîna Cibran, Qerekeçî ji alî Yawûz ve ji Kurdistanê re hatin şandin. Di gelek jêderan de Cibran wek "Boz Ûlûs" tên nasîn û yên di nava

van de yen em nasdikin jî Zerikî û Têrikî ne. Qerekeçî niha li Serê Kaniyê-Ceylanpinarê dijîn; hinek êlên mîna Şexikan, Mûsikan û Rûtikanê ji wan veqetiyabûn niha li navenda Anadolê dijîn. Di heman demê de êla Qoçgirî jî li alî Zara hatibû bi cîh kirin. Hinek jeder jî dibêjin ew ji alî Qanûnî ve hatine bi cîh kirin: Bi fermaneke re êlên ku çûbûn çiya dawetî çandiniyê kirine. Ev belav kirina ji seferê Bexda yê bişunde bû û gorî vê: Êla Qoçgîrî çû Zara; Şahdelî çû Kixî û Palû; Izol û Hîran hatin Pertekê; Balaban çû çemê Balaban; Şahveliyan, Kimsoran, Hamoçik jî çûn deşta Tercanê; Hormek çûn Nazîmiye-Civarik. Dîsa Balî yê girêdayî Hormeka jî çûn gundê Kiriktaş, Gurelik, Alacahanê girêdayî Refahiye û Halitler; Gawiryûrdû û Eskikonaka girêdayî Kûrûçayê.°7) Bi dîtina min ew hîn rastire. Lewra Qanûnî, piştî komkujiyên Selîm demekê polîtîkayeka bi vî rengî şopandibû.

Osmaniyan, Mekke û Medine dagir kirin bi şunde, mîrîtiyên Kurdan yek bi yek ji holê rakirin. Gelek caran jî ji bo Elewiyên-Sersorên alîgirê Şah İsmail û yen ji wî re sempativa xwe heyî re fermanên komkujî derxistin. Ji bo vê di navbera salên 1558-1591 an de gelek ferman derxistin û zordariveka mezin li ser Kurdan dom kir. Ji van fermanan emê çendikan

ji bo girîngiya wan binivsînin. Bi taybetî jî evên li ser êlan derketine balkê§ in:

1. Ji Bege Bozok ê re! Ew en ku naxwazin nimêja Inê bikin û guhdarî bikin re ye! Li Huseynabadê 3-4 mizgeft hene, lê ji sipahiyên Bozdoxan hinek alîgirên Huseyn û Kaya Buken, Yol Kûlû Yakûb û Xizir Sahê bûne Rafizî; aligirên wan pêwîste hema bêne girtin û cezaya wan çi ye bê dayîn! Sal: 1568 Selîmê II. (1/~133) Li Amasya navça Bûdakozu Silêman Fakih bi kesên din re cîvînan çêdike û gel teşfîkâ zindiqiyê dike. Eger ew raste, wî û ewên bi wî re di nava têkiliyê de ne, bi veşartî di çemê Kizilirmak de bifetisînin!(112'7y)

2. Ji bo Sersorên bajarên Merzifon û Amasya bên cezakirin! Ji Qadiyê wan bajaran re! Li herêma we kesên bi navê Wahap Dede, Mehmet û Weliyên Sersor hebûne; ewên ku gelê herêmê dikine bin bandora xwe, serokê wan bêine û bi gelê girêdayî xwe ve cem û cemaatê dikine. Dema ev fermana min gihîşt destên we, ewana bigirin û cezaye münasip bide wan! 1570 Selîmê II.

3. Ji bo Qadiyê Qastamonû -Küre û Taşköprü- Ji bo kesên Kizilbaş!

Ew kesên hana bi şev d içi ne maleke û li wir cem û cemaatê dikine; tembûr

lêdixine û araqê wedixune, bihevre şa dibine; piştre jî şemdanan vedimirînin û bi jinên hev re dikevine munasabetê...Hema fermana min bîne cîh, lîsta wan bişîne... 1571 -Selîmê II.

4. Ji bo ku Sersorên Nîksarê werin heps kirin ...kesana bigirin, navên wan li deftera "Sûrhûser" sersoran binivîsînin û wek mehkûmên deryayî ji me re bên şandin. 1572-Selîmê II.

5. Ji bo ku Sersorên li Amasya, Ladik û Havsa werin girtin-1574-Selîmê II. '

6. Ji bo waliyê Çorûmê! Fakih Weliyê ku Sersor û Rafizî tê nasîn 34 cîldên pirtûkên Rafiziyê anîne û bi veşartî li gel belav dike. Keşan bigirin û pirtûkan İmha bikin. 1576-Mûratê III.

7. Ji bo Begebegên Dulqadiri û Qadiyê Elbîstanê! Di herêma we de kesekî Sersorî bi navê Abdal xwe wek serokê Elewiyan dihesibîne û bi civaka Elewiyan ve di pêywendiyê germ de ye. Dema ev fermana kete deste we wî keşi bigirin û ji dadgehê şunda bikujin!." 1577-Mûratê III.

8. Ji bo Qadiyê Artûkabad û Zilê ku kesên bi Iranê re tekildar werin ceza kirin! Li herêma we Rafizi gelek bûne û li gundan cem ê dikine, ji kesen beşdarbûvi 1500 sikke yi komkirinê û teslimi aligirê Şah, Mansur Xelîfe bûye. Deftereka ji bo 3000 esker kom bibe hatiye amadekirin û li ser navê xelîfe sûrê banatî dane. Cem û cemaate kiriye... dema ev ferman kete desten te; ji bili kesên mezheba sunnî, yen din ceza bi kin ! 1579-Mûratê III.

9. Ji bo Qadî û begê Amasya re! Li bajarokên we mina: Çorum, Zile, Turhal, İskilip, Osmancik, Artûkabad, Huseynabad, Guleş, Ortaparê, înebazari, Mecitözü, Qerehrsari, Katar, Demîrlû û Havesa cem û cemaat dikine.... Nimêj û selatê nizanin; navên Ebûbekir, Ömer, Osman li zarokên xwe nakine...Ji bo cezakirina Qizilbaşân li wir ev emra mine! 1583-Mûratê III.

10. Li Meletî kesên ku ji mirovê li ser navê Şah İsmail derketî holê re diyariya dişinin pêwîste werin qetilkirin! Ji begê Meletî re! Cemeetê (êlên) bi navê: Izlû (Îzol-Izdigan), Rişvan (Reşî), Eşkan, Solak, Şûx Hüseyin, Soydan, Exirbuk, Adak, Kalaçak, Bezki, Çakal, Mihriman, Qeresaz, Komur yê girêdayî wilayeta we, kesê (heydût, şaki) li ser navê Şah Ismail derê holê keti re qur- ban şandine û xulamtî kirine. Kesê bi navê Mehmet e ku ji me re göte; em fer- manekê dişinin ku gihîşte destê we, ji nav ew êlên

li jor navê xwe derbas dibin, kesên ku xulamtiyê dikin Rafizi ne; wana derxin holê bigrin û cezê wran bidine û sicile nivîskî ji mera birêbikin. Ferman dibê! 2.Recep 986/1578-Mûratê III. (Kurê Selîmê II ya yê kurê Qanunî ye. Rêne birayê xwe kuştin, Tiflis û Fas hat heynan),

Bi vî rengi bi dehan fermanên din hene, beşekî mezin jî em nikarin bi dest bixin. Bi avabûn û firehbûna Osmaniyan re paralel, fermanên wek vana bi sedsalan bûn sedema Kurd kuştina sistematik, ku heta roja îro berdevvam dike. Di fermana dawî ya me li jor dayî de navê hinek êlan derbas dibe: Wek Izlû ku ew êla wek îzol û îzanlû derbas dibe. îro îzanlû li Xorasanê, îzol jî li dora Maden-Amedê dijîn. Reşî jî hema hema li her cîhekî Kurd lê dijîn hene. Komurlu li Semsûrê û Xorasanê ne. Yên din ji bo ku nav hatine guhartin em nikarin tam tespît bikin. Ji vê jî tê xuyakirin ku ew êlêna (yan jî beşek ji wan) sala 1578 an li Meletî bûne. Niqta din ê girîng jî ew aligirê Şah Îsmaîl, yanê Sersor-Qizilbaş in û ya din jî ew rastî komkujiyê hatine...Ew her sê xal îro ji ali Kurdên me ku bûne sunnî ve nayên pejirandin; lê qebûl nekin jî ew rasti- yeka dîrokî ye û di van sedsalên dawî de guhartinên pêk hatî re mirov nikare çavên xwe bigire. Ji bo rabirdû ew tespîteka girînge. Ji ali din ve, heta roja îro jî ew niqtên me hejmartin dibin sedema kuştin, koçber kirin û zindan kirina Kurdan. Piraniya wran êlan em ji sala 1519 an vir ve li Gerger-Besnî-Semsûrê

dibinin. Heta salên 1524 an em ji defterên nifûsê dizanin ku li vir in. Lê di sala 1536 an de em li wê herêmê nabînin. Tenê li dora Kolikê-Kahtayê hene. Mirov dikare texmîn bike ku ewên Kolikê yen nişteclh in, yen din jî koçber in.

Pişti ewqas ferman, eriş, kuştin û şelandina Osmaniyan, nerazîbûn zêde bûn û wek muxalefet-dijberî tevgera Celaliyan (1595-1610) destpêkir. Gor dîtina min, ew muxalefeta vê tevgerê heta roja îro dom dike, lê vê care bi mentalîteka hin peşketî û hin bi ısrar. Wê demê ji hemû

serhildanên cüda cüda derketî re Celali dihate gotin; sedema vê ew bû, ku serokê serhildana destpêkê Celal bû, paşâ ew hemû di qarekterekê de bûn. Yanê felsefe, siyaset, ol û bingehê wan ên civakî yek bûn.

Ji ber hovitiya Kûyûcû Mûrat Paşayû Osmanî 20 hezar Kurd reviyan rojhilatê Kurdistanê û çûn cem Xanê dest bi zêrînê Mûkrî (Bradost). Lê ew jî bû sedema gelek nexweşî û nakokiyan. Di vê demê de, bi taybetî jî di dema wî paşaye xwînxwar de Kurdan zirarê mezin ditin û ji axa xwe veqetiyan. Hoko dibêje; li hember serhildanan, Osmaniyan jî di salên 1603-1617 an de ji bo ku Kurdan ji welat derxin ferman derxistibûn. (32) Pêwîste ew hin zû be, lewra Kurdên Reşî di sala 1601 an de şandibûn Gîlanê. Beşek ji Kurdên Celali yên ku ji Anadolê derxistibûn, ji ber dijminatiya Sefawiyan a ji Osmaniyan kêm nevî ji Iranê dîsa vegeriyan. 24.000 mal bûn û li Kütahya, Eskişehir û li Menteşa Qastamonû bi cîh bûn. (32) Gor defterên Osmaniyan vê demê, komên wek Boz Ûlûs tên binav kirin, berbi rojavayê Anadolê çûbûn. Heta gelek ji wan heta İzmir û Kuşadasiye çûbûn. Gor texmîn dikim û hinekê jî bi ispat dizanim ew: êlên mina Canbeg, Têrikî, Zerikî û yên din in. Yên li wan deran mabûn îro bûne Tirk, yên din jî vegeriyan nava Anatoliyê.

Di sala 1611 an de Şah Ebbas ji Osmaniyan aştî xwest û ew yeka pêk anîn. Di vê salê de Kûyûcû Mûrat Paşa yê ku Kurd dikirin bîra mir, cîhê wî Nasûh Paşa derbas bû. Ew jî mirovekî xwînxwar bû, bi waliye Amedê ve ji êlên serhildêr penc hezar jin û zarok kirin şikeftâ û bi agirê li ber deriye şikefte vêxistî hemû dane fetisandin. Peymana 1611 an ku hatibû îmze kirin, bi şere di sala 1615 an de dawî lê hat. Damat Mehmet Paşa di vê biharê de çû ser Iranê. Emîrê Kurd Seyît jî çû ser Erivan û Ahcûhanê lê nikarî heyne. Di navbera Kurd û Tirkan de gelek caran şer derketin û her rûpelê dîrokê bi xwînê hâtive nivîsîn. Di sala 1616 an de serokê êla Mililan Ibnî Gazi Beg êrîşî keleha navça Salmasê Karniyarik kir. Bi ser vê de waliye Tebriz Pîr

Bûdak Xan êrişî ser Mililan kir û bi ser vê de Gazî Beg ji êlên Kurd û begê beganê Wanê Mehmet Paşa alîkarî xwest. Wî jî ji serokê waliye Hoşabê Zeynel Xan û der dora 10 hezar leşker komkir çû alikariyê û leşkere Pîr Bûdak têk birin. Vê bûyerê li Ezerbeycanê tirseka mezin derxist holê. Leşkere Şah Ebbas di 1617 an de heta Wanê hatin û her der wêran kirin. Di vê salê de sadrazamê Osmaniyan bi birek leşkeıen Tatar ve hate Amedê ku zivistanê derbas bike. Di 27 lion 1618 an de di navbera Osmanî û îraniyan de peymaneka nû hat mohrkirin. Ew peymanên hatinî kirin hemî li hember berjêwendiye Kurdan bûn. Di dema

Nadir Şah de (1727) êlên li Xorasanê yen mîna Çemişgezek û Qereçor bi Ozbe- kan re şer kirin. Paşe Şah evv ajotin Meşhede û gelek jî jê kuştin. (19)

Di sala 1607 an de begê Kurd ê bi navê Canpolatê ku navenda xwe Kilîs bû, li d i jî Osmaniyan serî hi Ida, lê li dijî arteşa Osmanivên ku di emrê Kûyûcû Mûrat de bûn têk çûn. Gor Şerif Vanli: Canpolatî ji Kurdên Colamergê bû, tevlî arteşa Eyûbiyan bûn, li hember Xaçperestan şerûn hêja kirin. Wekî mükafat jî keleh û der dorên Kilîsê dan wan. Di sala 1607 an de emir Saïd Canpolat serhildan kir. Di sala 1630 an de jî çûn Beyrûdê.{63) Wekî têzanîn §êxsiyeta wana yê tê nasîn Welîd Canpolat e, me carekê hevdû dît, digot ez Kurd im lê mixabin kurdî ji bîra kirine û heliyane! Di sala 1650 de (1059) Murtaza Paşa qasid şande bajarê Safed û Sayda ku ji wan bacê bigre. Wana jî bersiva: "Em tiştekî nadin, paşe çi dizane bila bike!" dabûn. Piştî vê bersivê jeder dibêjin: Em ji çiyayên Libnanê derbasbûn û gihîştin bajarê Sayda. Dema ji geliyê Nakûre re derbas bûn me bi Durziyan re heft seatan ceng kir; heta piştî nîvro sê hezar Nusayri batin kuştiıı û em ji geliyê derbasbûn. Eskerê Murtaza Paşa 280 miribûn û jê 700 kes jî birîndar bûbûn. Şexen Durzî ji bo ku dîlên xwe rizgar bikin mal anîn. .. (%/m/25)

Di serhildana Celaliyan de, Kûyûcû M. Paşa yê Osmanî, Kurd dikuştin û davetin çalan, ji bo wê ew navê Kûyûcû-bîr lê danîn. Li Baybûrtê jî ji seriyê Kurdan pîramîd çêkirin. Dema Mûratê IV an çû ser Celaliyan, ew li ser riya xwe kuştin û êla li Ezerbeycanê ya bi navê Zeynellî û yen din ajotin Ezingan, Tercan û Pasînê. Li Hozatê jî êlên mîna Koçûşaxi, Şamûşagi û Reşikan erişe Tirkên li Kemah û Çemişkezekâ dikirin. Di şere 1908 an de ev her sê êlan serî hildan û heta dawiyê li berxwe dan. (2=i) Gor deftera bajarê Enqerê, li navenda Anadolê Şamî êlêka federasyona Reşiya ye. Li gundê Ispanakê girêdayî navça Polatelî (li Torosan) ldrîs Kahya wiha digot: " Gundê me 40 xane ye û em ji êla Damişkilî ne. Dema êla me 700 kon bûye, texmînî 400 sal berê em ji Sêwasê rakirine, qir kirine û beiav kirine. Demeke em bi Reşiyan ve tevhev jiyane. Paşe, Reşiyan dest dane ser 400 pezên me û 500 lehengên me dîl girtine û eme şandine Şamâ. Evv bajara kalên me avakirine; heta derengî li Uzûnyayla, Qonya, Enqere û li Şame gelek malên êla me hebûn. Li gundê me çend malên ji êla Omeran û Bereketli hene. Malên Berkatî di xelaya sala 1290 (îro 1428 in)/l 869 hatine. (in(,105) Ji vê îfadê jî gelek rastiyên dîrokî têne derxistin: Navê êlê ya esas ne Damişkli ye; ji bo ku ji wî alî hatine û îhtîmaleka mezine ku ji bo statûyeke bi riya ol bi dest bixin ew nava lê hâtive dayîn. Ya din ew bi Reşiyan re tevhev bûne û li Xorasanê navê wan Bîçeran-lû derbas dibe û bi Sêvikan re pismamê hev in. Di nava wan de hebûna Omerî jî, îşareta Reşîbûna wan e. Lewra Omerî li Qonyayê girêdayî Reşiyan e. Yekê jî di sala tê qalkirin de gelek êlên li navenda Anadolê ji ber bê şiliye, ziwabûnê li dora xwe belav bûn û gelek ji wan jî çûbûn Çûkûrovayê. Berkatîyên girêdayî Reşiyan jî vê demê çûne. Wekî din jî gelek êl çûne; heta ji malbata me jî hinek malbat li wan deran mane...

Mû ratê IV an Bcxda heyna (1623) û êiên li Behdînan, Mûsil, Hewlêr, Kerkük, Şehrîzoıe jî tevlî leşkeren wî bûn. Ihtîmala zenda Şexbizinî ya di

vê demê de hatî koç kirin jî heye. Jixwe di vê demê de Mûrat gelek girîngî dida ku beg Ci mîrîtiyên Kurdan ji hole rake. Di sala 1715 an de emîretiya Baban û So¬ran ji alî Osmaniyan ve hate ruxandin. Herdû jî ji alî Huseyn Paşa yê nijadpe- rest ve ji holê hatin rakirin. Osmaniyan ji Erdelan şunda erîşî Loristanê kirin, waliyê Kurd yê bi navê Alî Merdan Xan dostê Şah bû, lê nikarî li berxwe bide. Osmaniyan zivistan li Kirmanşahe derbas kirin û paşe erîşî Hemedan kirin û gelê herêmê di şûr re derbas kirin.

Dİ sala 1638 an de Bexda dîsa kete bin destên Osmaniyan û bi peymana Qesrî Şîrîn ya di sala 1639 an de sînor êdî diyar bûn! Cara yekemin Kurdistan bû du parçe. Bi vê Osmaniyan dest ji Ezerbeycan kişandin Ci desthilatdariya li Bexda, Şehrîzor, Wan û Qersê Sefawiyan qebûl kir. Di sala 1732 an de jî Tebrîz, Loristan, Kirmanşah, Hemedan ji Iranê re ma; Şîrvan, Daxistan û Gürcistan jî ji Osmaniyan re ma.1®1 Bi aştiya vê care bi Iranê re kirinî re, êdî Osmaniyan giraniya hêza xvve dane dîzaynkirina hundur. Heta vê demê zêde nedikaribûn bi hişkî herin ser êl yan jî federasyonan; gelek caran çavên xwe ji Kurdan re digirtin. Lewra hêza wart ter nedikir. Di arşîvân Tirkan de gelek nameyên ku gîliya Reşiyan dike hene. Bê guman ji bo êiên din jî ew heye, lê ji bo ku Reşî bi hêz bûn, di nava babeta me de ye û em dizanin ku Osmaniyan çav li vê komê digirtine ku heta roja firsend ketê destê dewletê. Piştî peymana Qesrî-Şîrîn dewleta Osmanî ew rihetiya dît û vegerî ser êiên Kurdên koçber.

BI CÎH KIRIN

Eiên koçer yan jî nîvkoçer sîstema dewletê ya hundur dikirin xeterê; bac nedidan, esker nedidan; li cîhên derbasbûyî jî talan dikirin. Reşî, dema ji Helebê yan jî ji bakûrê Sûriyê derdiketin diçûn zozanên Sêwasê, Tokatê, Amasyayê û cîhên din, di nava dewletê de gelek pirsgirek derdixistin. Li ser vê riva dirêj desthilatdar ew bûn, ti hêzên din nasnedikirin. Ji alî din ve bi taybet jî di başûne (Sûriyê) sînorên dewleta Osmanî de jî ewlekarî

tunebû. Ji bilî wê, gelek cîhên vala hebûn. Ji bo ku êiên Kurd li vê herêmê bi cîh bikin, erîşûn Ereban bid in sekinandin, ew hêzên ku dewlet bi çavekî cûda lê dinêrî bihev bide kuştin planên cîbicîh kirine amade kirin. Ji bo wê yekê: Ji Hatay û Humusê bigre heta Rakka û Hesekê cîh dabeş kirin û sînorên êlan diyar kirin. Dewletê ji bo ku êiên Ereb ên mîna Aneze, Şammar rawestîne biryar da, ku êiên Kurd li hember W'an li Hama, Humus, Heleb û Rakkayê bi cîh bike. Eiên Kurd jî: Tirkmenên Helebê 2400 xane yan jî 30 êl, 18 êiên girêdayî Yenî îl; Lekvanik û 5 êiên mîna Heciyan, Akbaş, Kizil-Koyûnlû, Cîrîntilû yê girêdayî wan; 9 êiên Tirkmenên ji Bozûlûs manî yen mîna: Izzeddîn, Koçekî, Avşar, Inalî, Anterî, Omerî, Çopî, Qaraca Arapli, Çaxirganî Şereflisi; êiên bi Bozûlûs re girêdayî û li Keskînê rûdinên mîna: Cerîd, Koçekî, Yabaltûn, Tacîrî, Harbende,

Çepnî, Acûrî, Qere Araplû bi fermana 18 Adar 1692 an biryar dan. (9,M(,7) Ew êlên ku hatin hejmartin îro li Anatoliya Navîn in û piraniya vvan jê ji Reşiyan, Şexbİzinan (Ler), Oxçiyan û Têrikan in.

Em di belgeyên ji wê demê mane îro dizanin, ku Osmaniyan bi keviran sînorên navbera êlan diyar dikirine. Wek mînak: di 21 Çile sala 1691 an de Begebegayê Rakka, Kadizade Huseyn Paşe re ferman hat şandin ku li cîhên tespit bûne êlên Kurd werin bicîh kirin. (90‘58) Di navbera Reşî û Canbegên ku piştre anîbûn li Anadolê bi cıh kirin de sînor diyarkirin; ew sînora li gundê Şûrçe û Dîkîlîtaş de kevirên ku ji rojhilat berbi rojava dirêj dibû wek sînor di- hatin qebûlkirin. (90'56) Bele, cara yekemin di vê salê de em dibinin ku Reşiyan dişinin wê herêmê. Li wir bûyerên bûne babetên romanan in: ji alîkî ve erişen Ere b an, ji alîkî ve zahmeti yên xw'ezayî û ji alîkî ve ji azadiya Kurdan ji dest hate girtin, ji bo êlan bû trajêdiyên mezin. Di beşa êlan de emê qal bikin.

Ji bilî federasyona Reşî û Canbegan êlên din jî bi cîh kirin. Mufrizên eskerî li dû êlan geriyan û bi darê zorê ew şandin çolên Sûriyê û berpirsiyarek jî

jê re tayîn kirin. C. Orhûnlû wiha dinivîsîne: Tirkmenên mezin ên girêdayî Walîde Siltan a Uskudarê, Bexdîlî (Canbeg), êlên din û yên girêdayî Canbegan Akçakale û Aynî Riza li keviyê çemê Belîh bi cîh kirin. Li destpêkê tenê Bexdîlî bi cîh kirin, ji ber erişen êlên Ereban, Bayindir, Mûsacali, Lekvanikê girêdayî Tirkmenên Walîde Siltan Uskudarê bi cîhkirin. Bi fermana di 28 Adar 1691 an de jî êlên mîna Tata, Acûr, Gunce, Çepnî, Kiliçli, Çeçe, Kaz, Tûx, Şâx, Elçî, Kûbaş bi cîhkirin. Ji bo ku firar nekin jî, bajarokên mîna Behîsnt, Semsûr, Qeza Goynuk girtin. (90'5S) Gor jêderên din Canbegan di sala 1702 an de şandine. Bi dîtina min jî ya rast 1702 ye, lewra bihevre hêza dewletê pê nedikaribû.

Di vê serdemê de em dibinin ku gelek êlên Kurdan li dora Sêwasê dijîn; Divrîxî û cîhên din ên pir fireh de êlên mîna: Reyhan, Barak, Qereşex, Kûzûgu- den, Ilbeg, Milan, Ümran, Kangûn, Şefaat, Canbeg, Mamalû, Avşar, Qereçor yê mezin re, bi wata "Konfederasyona boylar/zendan" Reşî digotin. Kurmaç, Atma û Kiliç jî girêdayî vê bûn. (1M3) Herçiqas piraniya wan Reşî bin jî, bi te- mamî ne Reşî ne. Di serî de Canbeg, Milan ne Reşî ne, ew federasyon heta kon- federasyonê serbixwe ne. Bi vî rengî gelek şaşîtî di nava belgen Osmaniyan de hene, ji bo vê başe ku mirov bikaribe jihev derxe. Van êlana ji Mereşe heta Haymana der-dor talan dikirin. Dewletê jî dixw^est ew bi rêya kesên gotinên xwe derbas dibe li Rakkayê bi cîh bike. Yek ji wana jî Kose Paşa bû. Ji ber ku Reşî li hember dewletê di serhildanê de bûn, bi riya çexsiyetên baş ku ew nasdikin diketin kontrola dewlete jî. Di 7 hezîran 1697 an de ji w'aliyê Amedê re fermanek ji alî Mûstafa II an vê tê nivîsandin: " Qadiyê Divrîxî hat cem min û gîliyên gel anîn.. Ji koçberan Cîhanbegî, Qereçorî, Şamatorî, Horekiyan gelek kes li Dîvrîxî talanê dikin...Bêwîste ew w'erin ji Rakka û Hemayê re bêne ajotin...!" gor defterên muhasebe tê fêhmkirin ku berên êla Canbegê mîna Dîvrîxî, Taxrûdî, Dirîcanliyê berê li Amedê rûdinişstine û

teze dest bi koçberiyê kirine û hatine Gerger, Kahta û Semsûrê. Li wir ewdekariya gel xirab kirine.*129'

36> Umranlû yê girêdayî Canbegan ji cîhên xwe yen berê hatin Meletî û Kebanê. Ji bo ku ew zirarê nedin dora xwe, ji mutasarifê Meletî, Mehmet Paşa yê Reşî re hatiye nivîsîn. (129‘37) Ji vê fermanê jî tê fehm kirin, ku beşekî Reşiyan nişteclh in û beşek jî koçber in. Aliye din, texmîn dikim Canbegên li navenda Anadolê yen ji mile Umranlû yê hatî li Meletiyê ne...

Ji Waliyê Rakka Mûstafa Paşa re! Elên li Rakkayê bicîh bûbûn firar kirine û hatine herêmên mîna: Heleb, Şam, Trablûs Şam, Arzi Rûm, Mereş, Qers, Edene, Qereman, Sêwas û bajarokên li Anadolê. Fermana mine, ku tu wan dîsa bibî Rakkayê! Sal: 1110-1697. (161U7) Pişti ku ji bidh kirina Rakkayê dest berdan; êlên girêdayî Harbendelî, Koçeklî, Sîlsûpûr û betên girêdayî wan, di sala 1721 an de li Çîçekdaxi-Kirşehîre bi dh kirin. Milan di sala 1707 an de li Mêrdîne bi dh kirin. Kawî, di sala 1719 an de li Sêwasê li cîhê wan ê berê ji bo zivistanê bi kar dianîn bi dh kirin. Li Gerger û Kahta Semsûrê jî 26 gundên Zurkanli bi dh kirin. (90‘lü911ü) Navê Zurkanliya yê esasî Zerikî ye.

Ela Tabanli ya li dora Enqerê di sala 1842 an de, bi qasî 1230 xane-li 30 gundan belavbûn û navça pêkanîn. Kildonlû (Sewedî), Tabanli (Têrikî), Boynû Incelî û Yenî Î1 musteqîl kirin. (9n'll3)

Di sala 1696 an de hinek ji êlên Danişmendan li sencaxa Qere Hîsar-i Sahîb li navça Bûca, nahiya Pinarbaşi û Çolabadê bi dh kirin. Li Edenê, Ayas, Kinik û Berendiyê jî 20 êlên (1303 xane) Dulqadirî bidh kirin. Di heman salê de êlên Tirkmenên Mamaliyê mîna: Sorgûn, Akdax, Boxazliyanli, Buyuk Silêman- li, Emlak di nav sencaxa Bozok de bi cîh kirin. Hîn di sala 1693 an de zozanê Zamanti Pinarbaşi ya girêdayî Qeyseriyê wek cîhe îskanê hatibû destnîşan ki-

rjn (90-108)

Derbarê êlên li Rakkayê bi cîh bûbûn û dîsa vegeriyan Anadolê ge- lek ferman û belge hene; di yekê ji wan de tê gotin: Ji begebeganî Rakkayê Huseyn re! Elên ku li keviya çemê Belîç, Akça Kale, Aynî Zirî Rakkayê ji ber êrîçên rêbiran Urban belav bûne. Ji wana Izzeddîn, Kuçekî, Avşar, Înalî, Anter, Acarî, Cemolî, Omerî, Şark Çaxiranî yê girêdayî Boz Ulûs û Hamze Heciyan, Bidilêvê Mehmed, Ulaş, Bûrak, Bexmîş, Ganem ê Hecî Alî, Qere Şêyhan yê girêdayî Bexdîlî, Bozkoyûnlû, ...Bi giştî 3200 kes in. Ji ber rêbiran hinek ji wan hatine aliyê Rûm. Bi ser vê fermana min de, tu dê kesên bûne sebeb bigrî û di qeleyekê de cezê wan bidî; yên din pêwîste tu bibî cîhên berê! Sala 1102- 1689. (161102) Ji peyva Rûm mebesta wan rojavayê Sêwasê ye.

Di sala 1721 an de, ji Kizil Koyûnlû (Şexbizin-Ş) hinek malbat li navbera Iznîk û Sapancê bi cîh kirin. Di vê navberê de êlên mîna Harbendelû, Koçeklû, Silsûpûr û êlên girêdayî wan, berê biryar hatibû stendin ku li Rakkayê bi cîh bibin; piştre, di sala 1729 an de li gundên li dora Çîçek Daxi-Kirşehîr hatin bi cîh kirin.1156'681 Hinek ji wan bi heman navî li Xorasanê jî hene.

Li herêma Toyca ya girêdayî Haymana-Enqerê ye xan hatin çêkirin û hinek êl li wir jî bi cîh kirin. Di sala 1730 an de qadiyê Bozûlûs xwest xanekê çêke, ew ji alî dewletê ve jî hat pejirandin. Lewra karwanên hevreşim li wir

dişelandin. Giliyêgundiyên herêmê jîji rêbiranhebûn û jibo wanqirarhatdayîn ku derbend û mizgeft jî çêbibin. Ji bo ku derbend şen bibe ji zenda Bozûlûs, binek ji civata Saki, Şex Ahmet, Huseyn Heci d Küşne ya girêdayî Oxulbey ti derbend nivîsandin. Di 1731 an de ew malbatana xwestin ku vegerin cîhên xwe yen berê, lê hate red kirin. (156 72) Piraniya wan ji Têrikiyan pêk tên û hîna jî li herêmê ne, lê gelek ji wan

jî vegerin û hinek jî ji ber tîfoyê mirin û hinek ji ber şere Yûnaniyan reviyan.

Di bicîh kirina êlan de Yalman agahiyên giranbiha dide: Em Tirkmen 84.000 mal harin Colap (çol) û li wir hatin bi cîhkirin.1106"491 Ew hejmareka gelek mezine; eger mirov wan konana bi 7 kesên malbatê ve lihevbide, nêzîkî 600 hezar kes dike ku ji gelek bajarên Tirk zêdetir e. Paşe, ji her obe (gund-qebîlê) yê mêrek dîl girtin, kerîk pez birin û em bi zorê bi cîhkirin/106"49' Ji bo ku êl herin cîhê diyar bûyî, ji w'an rehine digirtine ku pir eceb e, Ji vê şûnde esîrên me serbest berdan û pezên me dan. Me can û malên xwe wergirt bi şûnde Colap terk kir. Ji Rakkayê em dîsa reviyan cîhê ku em jê hatibûn. Warê me yê berê Anadolu ye. Heta serok Fîrûz Beg dibêje: "Em nikarin li cîhekî wiha yê xerav bijîn, lawikê xwe Memed û 30.000 malên wan yekser çûn Ecem. Ewên mabûn niha ji Rakkayê heta Antakyayê bela dijin. Li ser çûyinê û şer gelek stran hene. Di yekê de wiha tê go tin:

Di wê stranê de jî diyar e û girînge ku be zanîn hinek ji wan çûne îranê (Xorasan) û şîna wan bûye.

Di bicîh kirine de tengasiya heri mezin êla Bexdîlî kişand. Ew êlên li Torosan ji: Beydîlî, Barak, Elbeylî, Bayindir û 48 oban pêk tên.[10&'49) Li wir jî diyar dibe ku beşekî mezin jê çûye Ecem. Li Xorasanê gelek gundên Bexdîliyan yen li navbera Bocnûrd û Aşxane de hene. Dibe ku ewên qetiyanî ew gundana bin, Dîsa heman nivîskar ji devê gel li ser baweriya wan jî agahiyan dide ku bi yen Kurdên li Anatoliya Navîn ve wek hev e: Li wir ji agir re hürmet pir mezine, eger zarokek bi agir de mîz bike emê lêxin(,ü6‘61)dibêje.

Dewletê gelek Kurd li vê herêmê bi cîh kirin; piraniya wan vegerin Kurdistan û Anadolê; gelek jî çûn Iranê. Ji bo hejmara wan Yalman dibêje: Li Rakkayê êlên Tirkmen wek 29 bend hatin bi cîh kirin. Lê îro tenê 8 bend

li wir man. Di nava wan de tenê wek biyanî Avşar hene. (1U6'93) Ew jî dide xuyakirin ku ji sisiyan dido reviyane.

Ji Tanzîmatê şûnde, Avşar li cîhê zozanên xwe berê Zamanti, li nehiyên mina Sa riz, Pazar Orenî yênavça Pinarbaşi û gundên Toklara girêdayî Tomarza bi giştî ji êlên din hemûyan zêdetir bûn. (90n7>

ji xanedana Kozanoglûyan ku laqaba xwe "Torûn" e, ji begê wan Huseyn axazade Mehmet Axa, Dervveş Axazade Ahmet Axa û küren vvî Hemze û Mûstafa li Qeyseriyê bi cîh kirin û maaşe wan hatİn girêdan. (834M)

Georges Perrotê fransizî di sala 1861 an de, 12 rojan li Haymanê dijî û wiha radigihîne: Gava min li ser dema bidhbûna gel ê wan û navçeyê pirs kirin, kalên wan baş nedizanibûn, le digotin ku 100-200 salên wan li wê navçeyê çêbûbûn. Bav û bavpîrên wan li ser wê erdê hatibim dinyayê". (34'30) "Kincên mêran bêtir dibiriqin û diyar e ew pir û pir ji qutikên sorî bi tayên zêr neqişandî hez dikin. Dênikên (kofî-tasên kolozan) serên wan kovikî ne, ne wek yen Tirkan li gora serî ne. (34'38) Heman nivîskar niqteka girîng jî dinivîsîne: " Li Haymanê, eğer yek ji herdu regezên xwediyên vê erdê di bin tesîra ya din de be, tişte balkeş ew e ku ne Kurd in ên di bin tesîra Tirkan de ne da ku rabûn û rûniştinen wan bigrind34 59)

Badilî berê li Erxaniyê rûdîništin û dieun zozanên Enqere û Çanqiriyê li Harranê hatin bi dhkirin. Ewna: Arşûvan, Ustûrgan, Çîmkan, Azman, Hed Kir, Kurdîkan, Mamavî, Mûdan, Osmanli (Otmanli) bûn. (90'59) Bi vî awayî dewletê êlên Kurd jihev êxistin, parçe kirin û heryek li aliyekî bidh kir û bicîh bûn...Ew jî li erdnîgariyeka gelek fireh pêk hat: Yen çûbûn Ecem li Xorasanê, hinek li bakûrê Sûriyê û beşekî mezin jî li navenda Anadolê bi cîh bû.

SERSOR-ALAVÎ-QIZILBAŞÎ

(Sûrhûser)

Heta vir min gelek caran qala ola Kürden koçber yan jî yen dervayê welat kir û gor wan tespîtan Kürden ku herî dereng ola xwe guhartibûn ew in. Kaniya ola wan Zerdeştî bû, lê gor demê û pêvajoyan di nav û naveroka wî olî de guhartin pêk anîn; ew neçarî vê yekê mabûn...Piştî tevgera Eba Muslimê Xorasanî û avabûna dewleta Safewî, em wana di bin navê Sersor- Qizilbaşiye de dibînin. Dema mirov li dîroka Kurdên koçber dikole dibîne, ku ew di baweriyeka hişk a Sersorîtiyê de bûne; ji ber wê jî ew rastê erîş û komkujiyên miletên cûda û misilmanan hatine. Sersor di belgeyên Osmanî de wek "Sûrhûser" derbas dibe; ji bo wan deftereka taybet hatiye girtin û navê deftere jî kirine Sûrhûser ku tê wata Sersor. Ew Sersortiya çi ye ku bûye sedema kuştina bi milyona însanan?

Kesrevî yê di vê mesêle de pispor wiha dibêje: Şex Şafî ku navê wî yê din "Zêrîn Kulah e", yanê: kizil şapkali an jî kizilbaş e bi zimanê tirkî. Bi kurdî jî tê wata kesê bi kumê sor.<24) Di seyehatnama Italyanan de jî hatiye diyar kirin ku wana li Anadolê kumê ku seiê xwe zirav dibûn wek kovik ji 12 zûl û sor e didane seiê xwe.1241 Ew kumê bi vî rengî em dikarin berî mîladê jî bibinin û Kurdên Xorasanê dema çûne wir jî kumên bi vî rengî bikar anîne. Di ser nivîsê de min navê Alavî jî bi kar anî, ku hinek dîtin jî dibêjin koka pey va Elewî ji wir tê. H. Kûtlû dibêje: Ji alîgirên baweriya Mazda re digotin Mecûsî yanê

agirperest; paşe gotin: zindiq, Gawir û hwd. C.otina Alavî jî ji agir te. Dr. C. Bender wiha dibêje: Alav kürdiye û wata gotinê ev e: kesê ku ji ronahiyê, tirê hezdike û hürmet nişan diciî ye. Ji bo wê gotine Kizilbaş. Lewra sor, rengê agir û alavê ye. Ji bo wê jî Sersor bi Elewî va tên yek watê. (,23‘94) Bi dîtina min jî Alavî rastir e, lewra ji alî dîrokî, civakî û olî ve ew peyv giredana vî olî û Kurdan hîn watedar dike. Peyva Elewî jî, li destpêkê, ji tirsa misilmanan wek taktîk ji alî bawermendên Kurd ve bi

kar hatiye. Pêdiviya veşartina dînê xwe dîtine û bi vî awayî Alaviyê kamûfle kirine. Ji alî din ve, ew peyva ji alî kesên ku dixwazin Alavîtiyê bi misilmantiyê ve û bi îmam Elî re girêbidin ve bi kar hatiye. Yanê

11 hesabê herdû aliyan jî dihat ku peyva Elewîtiyê bi kar bê û di dawiyê de ew bû. Di esas de ew herdû dîtin, îdeolojî û felsefeyên jihev gelek cûda ne.

Sersorîtî koka xwe bê guman ji ola Kurdan ya kevn Zerdeştî digire; di vî olî de jî agir û roj pîroz bû. Sora Alaviyan ji sorbûna rojê û pizota agir tê; îhtîmaleka mezine ku ew sora sembola roj û agir e. Wekî gelek nivîskar di- bêjin, Sersortî; berdewamiya Zerdeştî ye; bingeha xwe ji kesên xizan digire û bi misilmantiyê re hertim di nava nakokî û şer de bûye. Şûtî jî ji alî Parsan vê hatiye girtin û bi îslamiyetê re zêde neketiye nava pevçûnan û gor Sersoritiyê ji Islamê zêde stendiye. (125~9ô) Dîtineka di cîh de ye; lewra di dîrokê de jî Pars bi hêsanî teslîmî misilmanan bûne; lê Kurdan heta dawiyê li berxwe dane; yan jî welatê xwe terk kirine. Bi erişen misilmanan re Kurdan nedikaribûn îbadeta xwe bikin, ji bo wê jî di ola xwe de guhartinên sivik pêk anîne. Bi em- peryalîzma Islamê re, Mazdaîzmê xwe nikarî eşkere îfade bike, lê wek: Batinî, Sofîtî, Derwîçîtî û Tasafûîtî xwe di nava ocaxan de bi rêxistin kir û îro navê vê Alawîtiya Sersor e. (122',4> Bi rastî di nava Kurdên li dervayê welat de girîngiya ocaxa pir zêdeye; ji bo misil manekî girîngiya mizgeftê çi ye, ji bo Alaviyan jî wata ocaxê ew e. Kesekî zarokên xwe nebûn, dibêjin "Ocax kurê" yanê êdî mal şen, ronî û bi berdewamî nabe.

Gor felsefa Sersoriyê, beri dunyaye roj hebû û hertişt ji wê peyda bû: Berê roj, paşû agir, hewa, av û ax derket hole. Yanê vejîna mezin ji wan çaran derdikeve jiyane. Piştî wan jî, sê vejînên mezin tên ku ew jî: Ji axê nebat, ji wê jî heywan, ji wan jî însan çêbû. (122_33) Elewîtî û Sersorîtî berhema

felsefe û şaristaniyeka pt'şketî ye. (l24'47)Diyare, ku ew felsefe bi ya Zerdeştî ve nêzîkî hev e.

Gor baweriya Sersoran vejîn hersai tê nûkirin. Salek ji çar demsalan pêk tê. Van çar demsalan çar deri ne. Pîr H. Cîlasûn dibêje: Çar deri: Dibistana seretayî, navîn, lise û zanîngeh e. (124~93) Her deri ji sê, hersai jî ji 12 rnehan pêk te. Di Sersorîtî yê de sê, çar û 12 hejmarên pîroz în. (1223f,) Mümküne, ku federasyonên Kurdan yên ji 12 êlan pêk tên ji vê pîroziyê bingeh digirine. Yanê:

12 hêstir, 12 meh, 12 têla vên kuman û 12 êl... Yên dide û dizê di Sersoritiyê de ha-da ye, yanî kesê ku xwe dide û dizê ye. (122‘37) Di devoka Kurdên li Anatoliya Navîn de, ji bo Xwedê, Xudê tê bıkar anîn. Xudê tê wata kesê xwe dide, yê ku ji wê zayînê tê.

Şerten Sersorîtiyê:

1. Maf di insan de dibine.
2. Kemerbest bûyîn-Ikrar-kol dayîn.

a. Rind bifikirî

b. Rind bibêjî

c. Rind tetbîq bikî

3. Muhasîb bibî
4. Girêdayî Pir bibî (Ocax)
5. Divê xwe wek gelen çar derî û 40 meqaman bikî (perwerda wê bibinî). Di nav Kürden Anatolî yê de çilê zarokan bi merasimekê pîroz dikin, ku divê koka xwe ji wê §ertê stendibe.
6. Xwe li "dar" xî; yanê ji sale carekê di "Erkana Edebê" re derbas bibî (lêpirsîn). Di nav §ertên Sersorîtiyê de: Dost û dijmin bûyîna, dost û dijminê Hz Elî û giredana 12 îmanıan tune. Gotina: " Xwediyê dest, pişt û

zimanê xwe be" jî, ji bo Sersorîtiyê sist-xirav bikin tên gotin. (122'48) Eğer di bingehê debaweriyeka bi vî rengî tenebe jî, di praktîkê de carna giredana 12 îmaman heye; evv jî ji çespandinên zordaran tê. Lewra Kurd mecburî kamufle ki rina baweriya xwe mane. Imam Elî dibêje: "Kesê cara yekemîn misilmantî pejirandî ez im".023' 9) Di misilmantiya îmanı Elî de ti şik tune; le ji bo ku îktîdar nedan wî û ew demekê ji xelîfên din re muxalîf bû, ji wrê dijberiyê beşekî Kurdan jî piştgiriya wî kirin. Di pêvajoya demê de ew yeka zivirandin alîgirên Elî. Di alî îslamî de di navbera Elî, Ebûbekir û Ömer de ti ferq tunebû. Lê ji bo îktîdarê, bo aborivê û berjewendiyê nakokî kete navbera wan. Elî, bi ser gotin û hedîsên Eêxember de wergirtina rêvebiriyê garanti ditît; lê Ebûbekir bû şûnde jî, giredana xwe wî diyar nekir. Sedema aborî jî birêz Bender wiha radigihîne: Yek jî sedem ew bû, ku "Xurmelixa Fedek" ji dest malbata Haşîmiyan (Elî-Muhammed) girt. Bi ser vê bûyerê ve Fatma heta bimire bi Ebûbekir re deng nedikir-xeyîdî bû. Pişti ew mir, Elî, êdî Ebûbekir naskirl123'30*

Di Sersortiyê de av pîroz e û mirov nikare tif/tu bike û yan jî qilêr bike. Ji ber ku av sebeba hilberîn û paqijiyê û ji bo jiyane bi kar tê pîroz e. Çiya jî wiha ne. Lewra çiya bilind in û nêzîkî Xweda/ê ne û ji bo parastinê baş in. ibadet berbi rojê dibe; rojê nikarî bi tiliyan nîşan bidî yan jî berbi wê mîz bikî. Ew motîfên di Sersoritiyê de ji Zerdûştîzmd tên.'-l2:,"108) Heta dema dawî kalên

me ji me re digotin tife ave rneke gunehe. Rojê bi tiliyan nişan me de, pişta

xwe bi roje de miz bike u gelek tevger u qedexe bi vî rengî hebûn. Li Sêwasê

he ji Kurd berê xwe berbi rojê ibadet dikin û çiva jî pîroz in. Hemû ew karen

li jiyane û rûhiyetiya Kürden koçber bi emrên Sersortiyê ve hevdû ji sedî sed

digire. Di ser sortiye de tene şer tek heye ku ew jî: girêdana sozê vê.

Li Qoçgiriyê jina ji rojê re ibadet dike

Şerten îmana Sersorîtiyê:

Tenê şerteka xwe heye ku ew jî girêdayî kola-soz xwe biminî ye; yani ginêdayî Ikrarê biminî. Ji ber ku soz sedaqat e û soz hatiye dayîn insan, kesen ku soza xwe tuneye cewherê xwe jî nabe, cewher jî îman bixwe ye.1122'441 Di nava Kürden li dervayê welat de kol dayîn pir girînge; eğer kesek soza xwe neyne cîh tê wata ew hîç e. Di rewşeka wiha de mirovê bi wî rengî qet ji mirovan nayê hesap kirin ku ew felsefe ji Alavîtiyê tê. Wekî Pır dibêje: Di Elewîtî de Xweda insan e!(124'17> Hecî Bektaşî Weli gotiye: "Kabe ya min insan e". (12420) Hed Bektaş ji Xorasan hatiye û di baweriya Alavîtiyê de, bi Kurdên li dervayê welat ve ji heman kaniya dîrokî ne. Rêxistina Sersoran ya navendî Agirgeh- Ocax in. Sersor bi Şîa ve li hember misilmanan ketin nav îttîfaqê, lê paşâ Sersoran ji wê yekê zirar kirin. Gelek caran Şia ji bo berjewendiyên xwe Sersor

jı kuştin. Paytextê Sersoran bajare Yazd bû. Yekê jî, misilmanan mîsyonerên

sexte şandin nava Sersoran u mejiye wan tevlihev kirin. Bi taybetî jî di dema

Selçuqiyan û Osmaniyan de ev wek rêyekê bikar dianın.112 -1 Di nava Sersoran

de Agirgehen navendi-yen rnezin 12 ne; naven wan wek sîstema asîman lê ten

dayın u ti tekiliya we bi 12 ımaman re nine. 12 Ocax mina 12 burcen li asiman

in. Xaka Agirgehan ne male kesekê ye; mala hemu Can an e. Diçinin u tevhev

dixwin. Di ocaxan de ji bo her xizmeti, postek heye. Gor hiyarerşiye 12 post

hene. Di sen de poste Pır heye; paşe ji poste Xatûna bi Tac (Dayik) heye. Postê

Pır h raste Ocaxe, ye dayike jı li çepe ocaxe ye. Bi dore: Poste Reyber, zakır

(Hozan), Ezıngvan (Ocaxcı-çeraxcı-ruşen), Kurbancı, Lokmacı (xwarina hatı

di nava Canan de wek hev parve dike-Cılasun), Kuyu, Supurgecı (Parraş)

-

Cema şijinge ya Zerikiyan - Sêwas

Gozcu (bekçiye derî/ Çavûş jî heye ku civatê temaşe dike û kesên xirav ji Pîr

re radigihıne û ew jı ji ode daveje-S. Firat), lbrîkcî, Dolûcu (Sakî-dem-homa),

Sofraci teqîp diked122'52’041 Post, ji bo ku Pîr User rûdiniştiye li cem Sersoran pîroz

xuya dike. Ew li cem Kürden Anadole jı bi awayeki veşartı heye. Wek mînak:

Bere li lier maleke li jora ode postek hebû û mêvanên hêja li ser rûdiniştin û

giraniyek wı postı hebu. Hinek malan jı li diware malê dadixistin. Ti şik u guman nine ku ew kevneşopıya berdewamiya ola wan e kevn e. Ocaxa dawi u

yen serekî şuna dibistanê yê li Ardabîlê (1500) bû. (l22'89) Post meqamê gel e, bê destura gêl kes nikare li ser rûnê; serokên ku îzna gel sandinî dikarin rûnên û post cîhê ku serok lê rûdinê ye. (124 63) Ardabîl di dîroka Sersoran de cîhekî pir stratejîke, tevgera Şah Ismail jî ew cîha ji xwe re kiribû navend.

Ibadeta Sersoran bi hev re û di Cem û Civatan de pêk tê. Sîstema wê jî ya asîmanî ye. Semah Ci Sema peyvên Aryam ne: Sê=3, Mah=meh, hilal e û esmanî ye. (122"S5) Semah, dansa baweriya Elewiya ne. (124 74) Muzîk û bawermendî bi hevre tenê di Elewîtiyê de heye. Eger di Elewîtiyê de tembûr nebe, gotin nabe; gotin tunebe nefes nabe; ew jî nebe beyt; ew jî nebe dozde; ew jî nebe Semah; ew jî nebe Bawerî nabe. (124_100>

Diayên Sersoran;

1. Destpêkê roj derdikeve, ku ew zayîn e. Berî ku roj hilkişe, li ber agirgehê rêz digrin û agirgeha pîroz vêdixin. Berê xwe ber bi agirgehê ve dikin û cem-civat digrin.
2. Nîvro: wê çaxê roj hukumdariyê îlan dike.
3. Roj dikeve xewê.<122'59)

Cem, di salekê de çend caran pêk tên; yen girîng ev in: Kosegellî (Beran berdan), Sing sing, Dar (Mahkema gel û riza gel tê stendin), Iqrar, Kemerbest û în-yanê vejîna însan e. Yanî: în=ruh e, san jî=Laş e û herdû bihevre can peyda dikin.{122-h2) Heta demên dawî di nava Kürden li Anatoliy a Navîn de beran berdan û Sîn-sînko ye pir girîngî didane; lê niha ew jî ji hole rabûye. Sîn-sînko gor ez texmîn dikim di cîhê New'rozê de ye...

Aşûre: Di vvata şîva rojê de ye. Wek xwarina rizgariyê, ji rê yan jî ji rojê hatiye çêkirin. Ji 12 çûreyên xwarinê ku li mal tên ditin, aşûre çêdibe û piştî rakirina bênderan tê kelondin.n22‘63) Li Anatoliyê heta demên dawî jî Aşûre belav dibCı. 40 sal bere pîrika min dikeland û dicta destê min û min li cîranan belav dikir. Gelek bi tam û xweş bû.

Ji Sersoritiyê avêtin:

Cezaya herî giran; yê ji rê derketine, ku ji nava civakê tê qewitandin e. Eger kesek wan sûcana bike ji nava civakê tê avêtin:

1. Tqrarê xwe xirav bike û bi zilimkaran re têkilî û hevkariyê bike.
2. Here irzê û hürmet ji dê u bavan re neke.
3. Ji bilî parastina xwe ya nefsî kesekî bikuje, xesp û talanê bike. (I22'7S)

Alavîtî baweriyeka aîdê gelê Kurd û Arraniyan e; bi F.hlîbeytan (Muhammed-Elî) re ti têkiliya xwe nîne. Elî, xêr ji tekoşîna siyasî û navxweyî, ji alî îslamî û îmanî ve ti nakokiyên xwe û xelîfên din tunebû. Heta dawî jî girêdayî qanûn û biryarên îslamî bû. (123'90) Madem wiha ye çima Elewî ji Elî hezdikin û girêdayî wî ne? Çima Elewî, Emewî û Ebbasiyan wek zalimên mezin dibinin û ehlîbeytên ku li hember wan şer û tekoşın kirine re jî bi dil girêdayî ne? Piraniya 12 îmaman (Ji bilî Zeynel Abîdîn) hatin kuştin; wê yekê

hîsên dil eşe pêkanîn û gor wê demê: Ji ber ku Ii hember Emewiyan derdiketin, gel bawer dikir ku ew eniya muxalefetê ne. U Elewiyan, tekoşîna xwe gor wê bingebî danîn. Eelsefa ku ji nava Zerdeşti tê, bi vî awayî xwe di nav baweriyeka din de kamufle kir!123"91'

Wek tê zanîn Sersorî 1400 sal in ku qedexe ye. Pişti Tslamê jî mecbur maye ku xwe wek İslâmî nîşan bide Ci bi vî awayî heta roja îro karibiye bijî. Bi vê re girêdayî zêde bi navê Şîatî derketiye peş, Şîa, bi erebî tê wata

alîgir. Ew alîgiriya wê deme bi Şîatî ya îro ve eleqa xwe nîne. Alavîtiya ji bo Sersoran tê ziman jî wê çaxê tunebû. Şîatî di sedsala VIIT an de derket holê, wek mezheba Caferî jî tê zanîn û piştî îmamê VI an Caferî Sadik şikle xwe girt. Mirov dikare bibêje ku sentezeka Islam û Mazdaîzmê ye. Cara yekemin di sala 1500 an de li îranê bû îqtidar. Wekî tê zanîn hemû imam û Caferî Sadik jî wek kalê Elî şeriat dixwestin!122"9) Sersorî û baweriyên din ên mina: Zerdeşti (Mazda), Nûsayîrîtî, Sabûtî û Durzîtî baweriya gelê Aryenî ne!122"13'

Di demên derbasbûyî de coğrafya Sersoran ji Afganistan, Pakistan, Tirkmenîstan, Iran, Ezerbeycan, Kurdistan, Anadol û Xorasan dikire nava xwe!122"8' Xer ji Çelebî û Bektaşiyen mina Bedrî Noyan, yek ocaxekî Elewiyan li alîTirkan tune!124"15'

Hêz yan jî komên ku dewleta Safewî avakirin bi piranî Kurdên Sersor û kalên Kurdên îro li dervayê welat in; piraniya wan ji ber Osmaniyan ji Anadolê reviyabûn.

SAFEW!-ŞÛ

Wekî min li jor jî nivîsî; êlên Kurdên ku ji Anadolê û ji ber zilma Osmaniyan reviyabûn li Arranê (Erdebîl) xwe bi rêxistin kirin û bingeha dewdeteka olî avêtin. Navê dewletê jî kirin Safewî. Wekî berê jî min nivîsî, hinek nûser dibêjin ew nava ji êla Sêvikan hatiye girtin. Ew îddea jî mumkune; lewra yek ji avakarên vê dewletê êla Sêvika ye; dibe ku rêber ji nava wan derketibin, navê xwe dabin ser dewletê jî. Dewlet, ji motîfên nijadî zêdetir li ser motîfên olî û li hember misilmantî û Osmaniyên ku peşengiya vî olî dikirin hate dameziran- din. Rêber û êlên ku ew dewleta avakirin kê bûn? Em niha li bersiva vê pirsê bigerin:

Birêz Izadî li ser vê agahiyên girîng dide: Reîsê xanedana Sefawiyan û şexe xwe yê pîroz Şex Safî el-Dîn e. Jêdera derbaiê wî de ya herî baş, "Safwat

el-Safa" va Ibnî Bazzaz Erdebîlî ye, ku di wir de vekirî dibêje ew Kurd in. Gor Bazzaz: Kalê Şex Safî, Pîroz Şah Zarrîn-Kula (Zêrîn Kulah) di sedsala X an de bi êleka Kurd a mezin ve ji herêma Sîncar barkiriye Erdebîlê. Îhtîmaleka mezine ku ew Dimilî ye!154'113' Li ser Kûrmancbûna wî ez di şikê de me û xuyaye ku ew bi Şadiyan re hatiye. Lê ne diyare ku ew ji Kurdên bo heyfa Eba Muslimê Xorasanî hatine an na? Mumkune ku navê Kurdên Zerikî jî ji wî Zêrîn Kulahî hatibe û bi xwe jî Zerikî be. A. Tanerî jî wan dîtinan dipejîrîne: Xanadana ku

navê xwe da ye vê dewletê Kurd in; kalê Safiyîddûn Isheq Fîrûz Şah (ji Sîncarê) Kurd e. (S9~32) Nivîskar dibêje: "Dewlet bi Tirkên ji Anadolê hatibûn li ser piya ma." Lê d i rastiyê de ewên ji Anadolê hatibûn Kurd in û di beşen derbasbûyî de me anî ziman. Ev veka di êlên avakirî de jî xuyadike: Êlên ku dewlet avakirine

A - A A- A f ■'

ev in: Rûmiyan (Sêwas), Ustacûyan (Sêwas, Amasya, Tokat), Tekeli (Antalya), Şamî (Halep, Antep), Dulqadirî (Mereş). Ew êlên mezin di demeka ji 100 salî zêdetir de çûn rojhilat. (S9'32) Rûmî me got ku Reşî ne; Şamî li Xorasanê ne û min ditin û dibêjin ewpismamên Sêvikan in. Çavên wan ê reş û tevgera wan jî vê hîsê dide mirov. Ustacalû jî me got Kurdên îro li Xorasanê yen bi navê Laînî ne. Laîniyan bi Reşiyan ve axaftinên xwe nêzîkî hev in. Ne dûre, ku girêdaneka wan heye. Dulqadir jî me qal kiribûn ku Kurd in...kanî Tirkbûna wan? F. Sumer jî, ji A. Kesrevî û pirtûka wî ya bi navê "Şex Safî û Tebareş" bi awakî vekirî radigihîne. Navê pirtûkê balkeşe: Tebareş! Wata wê gele-reş e yanî Reşî ne! Sumer dibêje; Safewî ji alî Kurdekî ji Sîncarê yê bi navê Fîrûz Şah ve hate damezirandin û di vê de ti şüphe nine. Mirov dikare texmîn bike, ku Fîrûz Şah kalê Safiyûddîn îsheq e. Fîrûz Şah, di sedsala X an de, dema Kurd li Ezerbeycan û Arranê belavbûn hate Erdebîlê û nêzîkîbajer bi cîh bû. Piştî nîvê sedsala XI an

Selçûqî hatin Ezerbeycan, Kurdistan, Arran û rojhilatê Anadolê. Dema hatin li wan deran bi xanedanên Kurd yên mîna Rewadî, Şadî, Merwanî û Annazoxûllari ve rû bi rû man. Emîr Ahmedilî ji Şadiyan bû û ernîrê bajarê mîna Erdebîl û Tebrîzê bû. Hêza ku dewleta Safewî avakirî, ji Anadola Navîn û başûre Anadolê bû û Tirkên nû bûn û ew Sersor bûn. (1l2'2> Bi dîtina min Şex Safî el-Dîn li Erdebilê jiya û divê ocaxa wî ya pîroz jî li wir be, lewra ew hêiêma ji alî Sersoran ve pîroz tê dîtin. Yekê jî wê demê, ji Şex Cüneyt bigre heta Şah İsmail rêvebirên Sefawiyan ji alî gel ve wek "Mehdi", "Bêxember" heta wek Xwedê têne dîtin.

Fêwîste mirov niqteyeka dinjî zelal bike: gelê Pars jî ola Kurdan Zerdeştî pejirandibû; lê, li hember êrî§ên misilmanan wana bi tevahî ji ola xwe ya kevn devberdabûn. Yên li hember vê sekinîn Kurd bûn, ku ji ber wê ji wir diçûn wir û heta dawî li berxwe didan. Di wê demê de jî ew pêk hatibû. Yanî, êlên Kurd û yên Talîçê her tim di nava muxalefetê de ew' dewlet li ser esasê olî avakiribûn. Wexta ew dewlet li ser lingên xwe rawrestî; Pars sunnî-misilman bûn. Sefawiyên ku koka xwe ji Zerdeştî, Alavîtî û Sersortiyê digirte bi zorê ew' ol yan jî mezheba bi Parsan dîsa pejirandin. Ji bo wê; ola dewletê ya wê demê bi Şîatiya îranê ya îro ve ji hev pir cûda ye. VVekî Rafael Blaga jî dibêje: Şîatiya îro li îranê ji alî dewOetê ve wek mezheba fermî derdikeve peş. Caferî-Imamî- Şîatî ya bi 12 îmaman e; wek sunniyan baweriyê bi şerîatâ tinin. Sünnî ji vê Şîatî ya nerm re "Rafizî" dibêjin. Şîatiya din jî Şîatiya radikal e, ku Îsmaîlî (Elewîtî, Ehlî Heq) û Mûatasavvifa temsîl dikin. Taybetmendiya w'an kaiden şerîatê di praktîkê de berbiçav nagirin. (95‘4,) Di Şîahya îro ya li Iranê bi sunîtiyê ve ferq gelek kêm e. Şîatî di navbera Zerdeştî û Alavîtî û Islamê de pire ye. Kurdên Xorasanê hîna jî dibêjin em Îsmaîlînî.

Ş§x Şafî di demeka kin de bû rêberê êlên Kürden li Ezerbeycan, Ana- dol, Sûriyê û Başûre Kurdistanê. Li der dora xwe gelek bi hêz û hürmet bû, ku

davvetiya Ilxanliyan red kir. Xaka li ser dijî, dewletan nedikarî têkevin û jê bacê bîstînin. Bi dîtinekê Tîmûr ji Anadolê 30 hezar Tirkmen birine, lê Şûx ew îqna kiriye û wî jî ewana ji Şûx re cî hîştine. Ji vvana gelek vegeriya bûn we- latê xwe. Mirîde wan li Anadolê gelek hebûn. Êlên li bakûrê Azerbaycanê yên mîna Qereman û Qaçar jî girêdayî Erdebîlê bûn. (24)

Torinê Qere Yûsûf, Cîhan Şah dema li ser rêvebiriya Beraniyan bû, hez-kiriyê tekê Şex Safiyûddîn (1252-1334) ê li Erdebîlê bû. Ji bo derwûşûn vê tekê di nava dewletê de rihetbikin alîkarî dikir. Torinê Safiyûddîn û xwediyê tekkê Şâx Cüneyt li Anadolê propaganda dikir. Wê demê Cüneyt serokê Elewîtî û Bektaşîtî yê Ruhanî bû. Kalê Cüneyt Kurd bû. Di sala 1449 an de Cüneyt bû serokê Beraniyan. (101l98)

Dîroka Sefawiya bi Şûx Cüneyt destpê dike; mirov dikare bibêje ku da-wiya Beraniyan destpêka Sefawiyan e, lêwra ew dewlet li ser bingeha Berani¬yan hate avakirin. Cüneyt li Anadolê geriya û ji alî Kurdan ve nêzîkayiyeka mezin dît. Gelek kes li dora xwe civandin û ûrîşî (1456) dewleta Rûman ya Trabzonê kir, lê bi ser neket. Di vê navbera de ew dewlêta hanê jî, li hember gelek ûrîşan de mabû. Ji alîkî ve Osmanî, ji alîkî ve Cüneyt ûrîş dikir. Cüneyt paşê hat cem Hesenê Diiêj û bi xwîşka wî re zewicî.

Kralê Trabzone Kalo Ioannes kete tengasiyê, di sala 1457 an de qasid şande Amedê û li hember Osmaniyan ji Hesenê Dirêj îttîfaq xwest. Hesen jî keça wî ya xweşik, bi Kapodokya ve jê xwestin û kral ew daxwazan qebûl kir. Keça wî ya bi navê Despîna Xatûn hate cem Hesen. Ji wê Xatune sê keçik û kurekî Hesen hatin dinyayê, ku yek ji wan keçikana diya Şah Ismaîl bû. (138 418) Yanê Hesenê Dirêj kalê Şah Ismaîl e. Diya wî jî xwarzêya Grekiyan e.

Birêz Xemgîn dibêje: Cüneyt di sala 1456 an de mir. Di dema Heyder de oldarên (derwîş) di ocêx de perwerde bûbûn li serê xwe paçên sor girêdi-

dan, por û rî berdidan û li urbê (qolcix) wan îşareta 12 hebû ku ew nîşana 12 îmaman e. Seva wan kincana navê "ser soran-kizilbaş" li wan danîn. (101'202) Lê gelek nûser jî dibêjin êlaqa wan bi 12 îmaman re nîne û wekî Sumer jî dibêje ew di sala 1460 an de mir. Şex Cüneyt vegerî Arranê bi şûnde, erîşî welatê Şîrvan Şah kir û di şere li sala 1460 an de Cüneyt mir û bi alîkariya xalê xwe Hesenê Dirêj, Heyder li Erdebîlê bi cîh bû. Terîqeta Şâx Heyder, serê xwe li Erdebîlê, İaşe xwe li Anadolê bû. Alîgirê terîqetê pir kêm li îranê hebûn ku ew jî Talîş, Erdebîlî û Tirkên Qerecdax bûn; hêzên Qeremanî û Qacarên li Aran jî alîgirên Şûx bûn. (112 l2) Talîş êleka balkûşe û bi dîtina min li ser wan lêkolînên taybet pêwîst in. Li Gîlanê rûdinên, §iklê wan wek Kurdan e, bi texmîna min ew êleka Kurd e, li cîhê asê bi tenê dijîn. Divê têkiliya wran bi Hewreman û Goranan re hebe. Heyder, di sala 1486 an de bi 10 hezar kesî êrîşê aliyê din ê Derbend û qewmên Qefqas kir. Di sala 1488 an de ji bo tola bavê xwe, dîsa erişe Şîrvan kir. Ferûh Yesar fêhm kir ku ew nikare li hember Heyder bisekine

û ji Yakûp Begê Pezgewran alîkarî xwest. Heyder êrîsî lawxalê xwe jî kir lê di şer de mir. Ji kêça Hesenê Dirêj a xwarziya Grekan sê kurên xwe hebûn. Yek ji wan jî Şah İsmail bû. Mirîden Heyder kurê wî Ismaîl û Ibrâhîm li Erdebîtê di malêka Dulqadirivan de veşartin. Sumer dibêje: navê jinikê Aba (Ebe) bû ku ew ji êla Dulqadirî bû. (ll2'1;,) Ji alî êla Şamı yê Dulqadirî, ku kalê zarokê Heyder in ew revandin Gîlanê. Ismaîl, di 12 saliva xwe de (1499) ji Gîlanê vediqete û diçe Ercûvanê. Ismaîl ji welatê Deylem (rojavayê derya Kesk) tê Tarumê û li dora wî 1500 mirîden ji Şamiyan hebûn. (ll217) Wexta Ismaîl vegerî Lahîcanê li cem wî mamostê xwe yê ji êla Şamî Huseyn Beg, kalê xwe yê Dulqadirî Abdal Beg, Hadîm Beg, Ristem Beg, Beyram Beg, Qere Pîrî û Aygût Beg hebûn.*112 17) Ew navê êl û begên li dora Ismaîl jî didin xuyakirin ku ew ji Reşî û ji êlên bi Reşiyan re eleqedar in. Li Ercûvanê xeber ji mirîdên xwe yen li Anadolê re dişînû

û ji wan daxwaz dike ku li Ezinganê kom bibin. Bi xwe jî diçe wir. Wexta tê Tercanê ew ji alî êla Ustacalû ve tê pêswazî kirin.'112,8)Ji wê jî em fêhm dikin ku wê demê êla Laîn-Layînî li wê herêmê bûye. Ji Anadolê û ji herêma Sêwas, Amasya, Tokatê: Ustalcî, Şamî, Rûmî; ji Antalya: Tekelî; ji hêrêma Qere- manê Tûrgûtlû; ji Tarsûsê jî êla mîna: Varsak çûn cem. Ewêlana bûn ku devvlet damezirandin û dan berdewam kirin. (11219)

Osmanî wê katê li Modon û Korüne di şer de bûn. Beyazîtê II an li herü¬ber vê koça mezin dengê xwe nekir. Dulqadiriyê ku hakimê Mereş, Elbîstan û Xarpûtê jî bê deng man û deng nekirin ku gelek kes ji desthilatdariya wan he¬rin tevlî Ismaîl bibin, Di sala 1501 an de Qizİlbaşe li Ezinganê kom bûbun erîşû Şîrvane kirin. Paşe artâşa Pezgewran têk bir û fennî bû Sahê dewleta Safewî (1501). Di heman demê de li Antalya serhildaneka Sersoran ya girîng heye, ku serokê vê Şah Kûlû ye. Osmaniyan fine vê astê ku tememiya Kurdistanê dikaribû ji kontrola wan derkeve. Sînorê Osmanî-Sefawiyan, Sêwas-Sûşehrî û Firat bû. Meletî, Dîvrîxî, Darende, Dîlok di destê Memlûkan de bû. Bi rû vê de serhildanên Celaliyan destpêdikin û ew jî dibe sedema gelek komkujî, sirgûn û koçberiyan. Kurd çûn Iranê û Anadolê. Di fermana 1578 an de jî tê xuyakirin ku Mû ratê III an ji vê yekê acize.

Di şere Pezgewran (Elvend) û Ismaîl de, Safewî di 1501 an de bi serketin û Ismaîl li ser navê 12 îmaman xutbe xwend û li textê Erdebîlê rûnişt. Bi ser vê Hoca Sadeddîn wiha got:

Başina tac aidi çikti Ismaîl Tac da serê xwe û derket Ismaîl

Ittî bi-idrak Etrakî mirîd Mirîdên Etrak ên nez an (kûçik?) ew derxistin.mi'21)

Wata min ji wê derxistî ev e: ew kesa hêrsa xwe dide xuyakirin, ku Kurdên koçberên (Etrak) Sersor û kûçik (-ît/tî-yan jî ewê ku wî radikin) ew dane ser text. Wekî berê jî min nivisî dîtina min e; ji bo Kurdên nişteclh yan jî yên sunnî peyva Ekrad, Etrak jî ji bo Kurdên koçber bi kar dihatî li vir jî tê ispat kirin. Ku dîrokzanên Tirk ji wan re dibêjin Tirkmen.

Şah Îsmaîl bi keça begê Mûsil-lû re zewicî û jê kurê xwe yê bi navê Tah-masb hate dinyayê. Lawê xwe di sala 1515 an de kire waliye Xorasan û xezûrê xwe Emir Begê Mûsilî jî kire mamostê wî, di sala 1522 an de jî ji wezîfê girt.0,2 55) İsmail ji ali bavan ve Kurd bû; Tahmasb jî ji herdû aliyan ve Kurde.

A _

Elên Mezin ên ku Dewleta Safewî Avakirine

1- Rûmî: Ew ji ali êlên Sersorên li Sêvvas, Qerehîsar (Şebîn), Tokat, Amasya pêkdihat. Piraniya wan li dora Şîrvane di serokatiya Aras Xan de dijin. Osmaniyan wira girt bi şûnde gelek mal û can dan û li ali Aras Baran xwe bi girtin dan. Tünek li Xoy û hinek jî li Xorasan-Nişabûr dijîn. (112143> Rolêka pir giring list û gelek beg jêderketin. Wek: Dîv Siltan, Pîrî Beg û Nûr Eli.

2- Ûstacalan: Ew jî li Sêwas, Amasya, Tokatê dijîn û hinek êlên xwe heta Kirşehîıe belav dibûn û ji wan re 'Ûlû Yoruk' dihate gotin (Şadî-Okçû?). Navê xwe ji Ûsta Hecî digirtin. (Tê zanîn ku ji Cilan hatin Acemi Iraq, ji wir jî çun Ezerbeycan û ji wir jî çûn diyarê Rûm (Qerehîsar). Şah Ismail jî li ba wan bû mêvan (-Cimiû'i tevarîj-).<m 44) Gelek beg jê derketin, lê ya balkûş Kurd Bege. Li Elalhal, Korta Şadî de bi Şamlûyan ve tevhev dijîn û warekî wanî herdemî tunebû. (ll2 l44) Li van deveran hîna jî Kurd hene.

3- Tekeli: Li Antalya bûn. Ew li dijî Ûstacalî, Şamî û Dulqadirên ku di xizmeta Hamza Mirza de şerkirin, perişan bûn û reviyan Bexdayê. Di sala 1596 an de ji Şah derbeka mezin xwarin; yên ji ber wî reviyabûn jî xwe avêtin paş melike Amûl û Şah Ebbas ferman da, ku hemû Tekelûyan bikujinY121691

4- Şamî: Havînan diçûn Ûzûn Yayla, zivistananjî li Heleb, Dîlokê dijiyan û di dema Osmaniyan de wek 'Tirkmenên Helebê' dihatin nasîn. Begê xwe yê navdar Lala Huseyn e, ku berê li Şirvan, paçê jî li Heratê walî bû. Ji Şamlûyan, Mecnûn di sala 1552 an de waliyê Esferayinê bû. (112‘93) Ji dema Selçûqiyan ve, di navbera Heleb û Sêwasê de koçber in. Di tarîxên farsî de wek "Etraki Şam" yan jî "Tirkmanî Heleb" derbas dibin. Ew jî, êlên mina: Avşar, Bexdilî, Inailû, Harbendelû û Bayat in. Beşekî girîng li Xorasan, Rêy, Ezerbeycan jî hene. Berên xwe jî ev in: Bexdilî, înalan, Hûdabendeliyan, Avciyan, Bîçeran, Abdûllan, Ke¬rameti, Acîran, Arabgîran, Nilkas in. (112173)

5- Dulqadir: Li Mereş, Bozok-Yozgat dijîn û gor jêderên Safewî ew 80.000 mal bûne. Abdal Beg li Mervê walî bû, ji ber Ozbekan reviya û Şah kincên jina lêkir û li ser kerê ew gerand. Di 1546 an de di navbera Dulqadir û Avşaran de alozî derket. Ji Dulqadiran Şah Kûlû Xelîfe, ji Avşaran Sevûndûk Beg gihîştin hevdu û aram kirin.*112'95) Berên xwe ev in: Kavurgan (Seraks), So- klen (Kirman), Şemseddînan (Qerebax), Eymûr, Heciyan (li Esterabad), Sarû, Sêxan, Camûsan, Çîçekan. (112178) Bawer dikim Oxçû ji vê êlê ne.

Êlên Biçûk:

1- Varsak: Li Tarsûsê bûn.

2- Çepnî (Şexbizin?): Di sedsala XVI an de beşekî xwe di nava Tirk-

menên Helebê de, beşek jî di nava Ülû Yorukên Sêwas, Tokat û Amasya de bûn, Dîsa beşekî mezin jî li Trabzon, Bayburt, Gîresûn û Canîkê dijîn.

3- Arabgîrî: Li Meletî bûn û ji wir gelek Sersor çûn Iranê. Paşe tevlî Şamiyan bûn.

4- Tûrgûtî: Qereman in.

5- Bozcaî: Girêdayî Heleb Tirkmeniyan e.

6- Acîrî: Girêdayî Heleb Tirkmeniyan e.

7- Hinisan: Kurd in.

8- Çemîşgezekî: Kurd in û ji Dêrsîmê ne.

9- Qeremanî: Di dema Şah İsmail de ew li Arranê dijîn. Navê xwe ji begê bi navê Qereman wergirt. Ji begê wê êlê Beyram, Xorasan hate girtin bi şûnde bû waliyê eyaleta ku Belh, Murxab û Garcîstan di nav de ye. Di sala 1512 an de di şere Ozbekan de mir. (112"54)

10- Avşar: Begê xwe Şah Ruh di heynana Xorasanê ya cara duyemîn de (1513) navê xwe derbas dibe. Siltan Elî Mirza jî di Çaldiranê de got Şah ez im û jiyana Şah İsmail rizgarkir.|112‘56) Di dema Tahmasb de piraniya Avşaran li Kûh Gîlûyê û Xuzîstanê dijîn. Di sala 1548 an de waliyê Kûh Gîlûyê jî Avşar Mehmûd Xan bû ku 3000 siwariyên xwe hebûn. Dema Tahmasb mir serokê Avşaran Xelîl Xan bû ku di bin fermana wî de 10.000 kon hebûnT12100) Di sala 1580 an de Şah Îsmaîlekî sexte derket û Lor li dora xwe komkirin. Êrî§ê Avşaren Kûh Gîlûyê kir û hemû belav kirini112~132) Elen Avşar: Gündüz, Araş, Alp, Eber û îman Avşari ne. Eben ji ber Şah Ebbas li Kazwînê dijîn. Ebbas ew şandin Abiverd û Cemşîde Gurcî je re kire serok.<112'191)

11- Tirkmen: Beşen êlên Mûsilî û Pûrneken ji Pezgewrên di nava Sefawiyan re tê gotin. Di esas de ecêb e, ji ber ku êlên din jî Tirkmen in çima

tenê ji wan re gotine? Tahmasb jî bi keçikeka begê Mûsilî re zewicî; kurên xwe Mu- hammed û Mirza Siltan jê vê jinikê bûn. (112101)

12- Qajar (Kaçar): Li Erranê bûn. Piştî Osmaniyan wira girtin, çûn aliyê Iranê. Berê xwe ev in: Axcakoyûn, Axçan, Şam Bayad, Yîva, Îgîrmî Dort. (ll2184) Axcakoyûn, yek ji êla Dulqadiran pêk tê ya herî bi hêz e. Li sedsala XVI an li Mereş-Elbîstan, Sêwas, Amedê bûn. Sala 1527 an tevlî serhildana Kalender Çelebi bûn. Li Kirşehîr, Qonya, Afyon û Aydinê jî ew hene. Yîva: bi vî navî di nav Tirkmenên Helebê, Dulqadir û Yenî Î1 de êl hene. (ll2'186)

Koçberiya ji Anadol berbi Iranê sedsalan ajot; koça yekemin di sala 1336 an de waliyê Moxolan yê Amedê Alî Paşa, Uyrat erîşî hukumdarê îlxanli Arpagaûn re destpêkir. Bi serketina Ûyrat re ji Kurdistanê gelek Moxol û Tirk ÇÛn Iranê. Di heman salê de, ji Anatoliya Navîn koçberiyek pêkhat.012"41 Di sala 1618 an de Kurd bi zorê koçberî Iranê kirin. Piştî wê demê ji salên 1692 an bi şûnde jî, Kurd ji çolên Sûriyê çûn Iranê. Lê mirov dikare bibêje ku demên ku nûser tîne ziman koçkirin hîn ne sîstematîk û bi berdewamî bûn. Yekê jî tenê Beranî yan jî Sersor neçûn Iranê. Kurdên di nava PezgewTran û Osmaniyan

de yen sunnî jî çûn; sedema vê, bê tehamûla Tirkan ya li hember Kurdan bû. Çobanli Şex Hesen û Demîrtaş ji Anadola Navîn grûbek bir, ku ji herdû komên din pirtir bû. Di sedsala XV an de Beranî û Pezgewr jî çûn îranê. Beraniyan ji dora Mereş-Elbîstane Axaç Erî birin. Ji bo ku di nav daristanê de dijîn ew nava lênan. Berdevvamiya wan koçana hertim hebû/112'3*

Di sedsala XVI an de li îranê xelk wek Heyderî û Nemetî bûn du beş; damezinerê Heyderîtiyê Şex Heyder e, ku li sedsala XIII an li Xorasan hatiye dinê û radikal e. Ibrâhîm Faxraîce jî vê cüda şirove dike: Safewî alîgirê Şûx Heyder (bavê Ismaîl); Pezgewr jî alîgirê Şûx Nemetullah bûn û herdûyan jî ji bo desthilatdariyê tekoşiyan.195'54* Mümküne ku di vê demê de guhartin di nava mezhebê de pêk hatibe. Yanî pêvajoyekî ji

Alavîtiya radikal (wek Zerdeştî) berbi Şîatiya îro destpêkiribe. Ji bo ku nefreta misilmanan zêde nekişînin ser xwe, rêvebirên dewletê ew pêdiviyan dîtibin.

Îsmaîlê didûyan ji nişkeva mir; êlên di nava dewletê de ketin pêşbirka text û herkesi dixwest ji yên din zêdetir cîh bidest bixin. Bi ser vê de, Tirkmen bi Tekeliyan ve li hember Şamî û Ûstacaliyan ketin tekoşîı^. Emîrên Xorasan kom bûn; wana Alî Kûlû Xan ji xwe re kirin xanedanê xanê û Ebbas Mîrzayê 10 salî jî kirin hukumdar. (U2l26> Tirkmenên bi vî awayî têne bi navkirin piranî êlên ji Pezgewran veqetîne, yên din jî di damezirandina dewletê de rolên sereke lîstibûn. Di vê tekoşîna navxweyî de aliyê êlên Xorasanê bi serket û Ebbas anîn ser text.

Şah Ebbas hate ser desthiladariyê bi şûnde, êlên Kurd ku ew anîn wê astê û kirin Şah jî re, pişta xwe çexkir û gelek ji wan li nava Iranê belavkirin. Ji wan êlana: Avşar, Dulqadir, Qaçar, Bayat û yên din warên xwe yên berê winda kirin. Ji ber wê: Avşar ji Kûh Gîlû, Dulqadir ji eyaleta Fars, Qaçar ji Qerebax, Bayatan jî Kezzaz û Girûhrûd ji dest çû. (I12‘l4S) Ew spasiya Ebbas bû. Sedema vê jî tirs û bihêz kirina desthilatdariya xwe bû. Ji wan êlana ditirsî, ku rojekê dê wî jî ji text deynin. Ji bilî wana desthilatdariya Lor, Gîlan, Mazenderan, Sîstan û Lar jî belav kir. Heta li nava hinekan nifûsa Tirk bi cîh kir. (112 ,52> Dîrokzanê Tirk xwe li vir dide dest. Bi rastî jî li Xorasan min dît: Li navebra gelek gundên Kurd, yên Tirk û Farisan bi cîh kirine ku wan asîmîle yan jî kontrol bikin. Ew kiryarana li Iranê bûn; li bakûiê Kurdistanê û cîhên din heman kiryar berde- wam bûn. Ji Anadolê jî koçberiye domkir. Di sala 1603 an de Erîvan dorpêç kiribû ku ji Anadolê 2.000 mal hatin. Ji bo ku wana li Anadolê gelek talan ki¬rine, ji wan re "Sîl Supuren" yanî ewên erdê paqij û rûş dikî gotine. Şah, wana li Savê, Rêy, Huvar û Fîrûzkûh bi cîhkirin. Sala din komek din hat. Dîsa êla Mukadema li Pasînlerê jî çû û wana li Meraxa bicîh kirin. Dîsa ji Beydîlivan êla

Gundogmûş kete xizmeta Şah û vê re gotin "Şah seven". (112154) Di sedsala XVII an de Fîrûz Begê Begdîlî ji Rakkayê çû îranê. Dema Şah Ebbas mir 93 beg li ser karbûn; ji wana 72 serokên êlan bûn. Ji wan dudu Afgan, yekî ji Sîstan û 12 de jî Çaxatay bûn. (112156) Yên din serokên êlên Kurd in. Demeke jî begên biyanî didan ser êlên Kurd. Wek mînak: Gurcî Gûrgîn waliyê Gîlan û serokê Çepnî

yê. Gurcî Cemşîd jî hakimê Abiverd û serokê êlên mîna Avşar ê Eberlû yê ku sirgûne wir kirine. (m'156)

Nadir Şah (ji Afşaran oba Kirklû bû),(l3l176) arteşeka ji komando û hêzên çalak pêk anî, bi wan: Afgan ji welatê xwe avêtin, Osmanî û Rûs jî tirsandin. Bi wî avvayî di sala 1736 an de arteşeka ji 80 hezarî avakir ku ew ji: Afgan, Tirkmenên deşte û Kurdên Xorasan, Tirkmenên Qizilbaş û hêzên ji rojavayê Iranê wek partîzanên Safewî pêk dihatin. Serbazênxwe bi piranî ji Qizilbaşan hilbijartibûn. Di sala 1741 an de arteşa xwe bûbû 150.000. Sala 1744 an tenê ji Hemedan 90 000 eskerên wî hebûn. Yên din wiha belav dibûn:

Ji Xorasan (Kurdên sunnî) 65.000

Iraqi Ecem (şîa)-tufengcî 45.000

Lor, Bextiyarî, Erebên Xuzîstan 50.000

Ezer bey can, Gürcistan, Ermeni, Şirvan 50.000 (Tirkmenên Şia ne

û ji çîna tufengcî-tivingê ne). (172'5ü6) Wekî diyar dibe di artöşe de gelek Kurd hene. Lê Kurdên Xorasanê ne sunnî bûn, di wir de şaşitiyeka nûser heye. Ew Kürdana bûn ku dewleta Safewî li ser rnilên wan hate avakirin û ti caran sunnî nebûn. Bi vê awayê nebûn xwedî tiştekî jî. Ew jî nezanîna Kurdên demê nîşan dide, ku ji bo ol û mezhebê xwe feda kirin, mala xelkên din ava kirin, welatê xwe terk kirin û di dawiyê de jî sûcdar ew bûn...

A

El

(Eşîret)

Eşîret peyveka bi zirnane erebî ye, di kurdî de jî wek êl tê binavkirin. Ê1 çi ye, yan jî ji kê re êl tê gotirı? Mirovên di organîzasyonan êlê de; ji bo ku xwe li dijî karasatan, komên mirovên din, xw'eza û xeteiên din ji bo ku xwe hîn baştir biparêzin kom dibin; êl ji bo vê yekê pêk tê. El ji malê dest pêdike, bi kon, zom (1+3 malbat), oba û qebîle berdew'am dike. Ahmet Ozer êlan wiha tarif dike: Ew'ên bi xwîne bihev giredanî û li cîhekî bi şerten xwe taybet dijî û yên koçeber re tê gotin. Di nava êlê de giredana bi xwînê pir girînge û bi vê riyê girêdana bi malbat û merovatiyê têkiliyên di nav û dervayê êlê de tesîreka mezin çêdike. (7S) Koma li ser bingeha malbatekê belav bûyî û pir bûnî re mirov dikare bibêje êl; mîna dareka şax, çilo û pel dide mirov dikare tarif bike. Di vê de bingeh hem an malbat û xwîn e. Dem a malbatek derket dervayê sînorên merovatiya xwînê û meydaneka hîn fi reh belav bû dibe êl. Dema malbat fireh bû, girêdana têkilî û hêzkirina malbatî kêm dibe û şuna wê yekê berjew'endî, ol û edet digi- rin.'i“10' Ethem Xemgîn dibêje: Di dema berê de, êlitî ji malbatê destpêdikiriye û wek, qebîle (ber), êl berdewam dikiriye û êl jî girêdayî federasyona êlan ya bi navê "Gaû" va bûne.<52)

J

Dema qala êlan tê kirin, koçberî, pêz, kon û komên gerok tên bîra mi¬rov; gelo êl tenê koçber in? Dikare nişstecîh jî bibin, lê dema êl nişstecîh bê pişti demekê jî derdê êlên din yan jî mirovên din jî di navê kevin û êl taybetmendiya

xwe wenda bikin. Birêz Beşikçi taybetmendiyên êlan û koçberiyê wiha dide xuyakirin: Koçberî, di peşketina civakê di destpêkè de tê ditin û

sîstemeka ekonomik û politik e. Ji bo, ku bi dewar û jiyana civakê re têkildar e ekonomik e û ji bo ku bi civakê din re tekîldare jî ew politik e. Mirov dikare êla koçber wiha tarif bike: Civakek: bi mal û cîhekî sabit re ne girêdayî, tenê bi sewalên serçûk re mijûl in. Ji bo ku zozanên hin baştir peyda bikin, ji zozanan terin Stepan û ji wan jî terin zozanan. Hertim di konan de dijin, bi giredana xwînê û bi hîsên "em" ve girêdayî hev, tim dixwazin girêdayî serokekî bibin, xwe- diyê ekonomiyeka kêm-zêde girtî, girêdayî çanda xwe û laik e. (1Ê,7‘6ti> Bi dîtina min mirov dikare li wê, sîstema eskerî jî zêde bike, lewra gor tarifa Beşikçi êl tenê wek koma ekonomik xuya dikin. Le ji piyê girîngî êla û koçberiyê yek jî eskerî ye û erişen ji derva ne. Bi piranî ew eriş ku bûne sedem ew êl ji cîhên xwe barbikin û xwe wek rêxistineke eskerî jî organize bikin. Li ser wî bingehê êlan sê taybetmendiyên xwe hene: Ali aborî, civakî û eskerî. Aborî li ser ajalan û hatina wan e, lewra tu dikarî ji cîhekî bibi cîhekî û mirov dikare li wê heştir, hesp û ga jî zêde bike. Êl di nava xwe de û bi mirovên dervayê xwe re jî di têkîlî û bazarê de ne. Ji bo parastina êlê ew xwedî hêzaka eskerî ne jî. Gelek caran ew hêzên êlan tên cem hev federasyon û konfederasyonan pêk tinin. Di civaka Kurdên koçber de, rêxistinên hin bilind ên mina dewletê jî (Şadî, Germiyan, Qereman, Beranî û hwd) hebûne, lê ji bo ku ew xwe ji mentalîta êlîtiyê tam riz- gar nekirine û yekîtiyeka hin fireh û kûr pêk nanîne, dewletên avakirine dirêj nejîn. Wek mînak: Eğer Sadî û Merwanî; Germiyan û Qereman bigihîştana hevûdu, îro Kurd xwedî dewleteka mina Rûsya fireh, bi serhejmareka pir û bi hêz bû.

Êla Kurd; yekîtiya kom û komên; ku endamên xwe ji tehlûkên derva biparêze û ji bo berdewamiya edetên kevn e. Rondot wiha bi beş kiriye: Êl: di bingeh de ji malbatê destpê dike, paşâ çend mal dibin bavik, çend bavik ber a derdixin û ew jî êlan derdixin holê. (2170)

Di nava êlên Kurd de rêvebiriyeka bi sistem jî heye û di asta heri bilind de em Boy Beyi dibinin. Lê ew peyva Boy Beyi ne kurdî ye û ji tirkî ketiya nava zimanê me û di kurdî de peyva Mir û Mîrêmîran heye. Li ser vê babetê Dr. T. Gunduz dibêje: Ji ber ku êl li cografyekê de, di nava hiqûqekê de him di nava hev de him jî li hember dewletê di nava sîstemekê de bûn. Gîhîştina hevdû ya êlan ji ali rêvebiriyê de Boy begî tanî holê. (1151l3) Wekî min gotî ew di kurdî de Mîrêmîran e; yanê serokê federasyonu ye. Heman nivîskar dibêje: Di derece yekemin de Boy Beg hebû; wana bi pêsniyara pîrên êlê, kethüda û voyvodan û ji alî padişah ve dihatin tayin kirin. Di nava dewlet û êlê de kesê tekiliya bû.111-' 113) Ew sistem ji bo Reşiyan ne bi vî awayî bû; serokên êla ji ali gel ve dihatin hilbijartin û wan serokana jî Mîrêmîran di nava xwe de hildibijartin. Ew sistem Osmaniyan ji bo federasyon êlên bihêz pêk dianiye; yen lawaz ji ali dewletê ve dihatine tayin kirin. Serokên bi hêz, pir caran navê xwe didan ser êl an jî federasyona êlan.

J

C. Orhûnlû dibêje: navê elan 11 destpêka ji navên serokan dihatin wer-girtin. Paşe jî gor cîhê ku lê rûdiniştin dihate tespîtkirin. Sê-çar beşen ku ji nava êlekê derketî û bi navên cüda batine destnîşan kirî jî rastiyeke. (l*Mtl5) Bi piranî êlên Kurd navê xwe ji serokên xwe digirtin; wek mînak: Xel-Xelika, Bil- Bilika, Şex-Şexika, Sêfo-Sêvika, Mil-Milan û hwd. Lê di dênia Osmaniyan de, ew yeka ji alî dewletê ve bi zanistî hatiye guhartin. Gor heiêman êl dabeş ki¬rine û gelek êlan bi navekî xwendine. Ew jî karê me dijwartir dike. Wek mînak; ji bo gelek êlên li dora Helebê dijî re gotine "Tirkmenên Helebê" ku di nava wan de federasyona êla Reşiyan, Têrikan, Sewêdiyan û yen din hene. Dİ nava "Boz Ûlûs" de jî gelek êl û federasyonên êlan yên cûda hene.

Ji gundê Beşqardeş malbateka Reşî

Parçên êlên ji hev veqetîne

Kurdên li dervayê welat, yanî ew ên îro li dervayê sînorên Kurdistanê dijîn, gelek caran hafine parçekirin. Sedemên vê yekê gelek in. Di serî de erişen ji derva ne; nakokiyên olî ne û şere di nava êlan bi xwe de ye. Ew parçên ji hev veqetiyane li cografyaka gelek fireh belav dibin. Parçê Kurdên îro li navenda Anadolê dijin: ji Lazqiyê bigire heta Heleb, Dîlok, Gumgum, Meletî, Semsûr, Dêrsîm, Erzirûm, Qers, Agirî, Erivan, Erdebîl, Tebriz, Qazwîn, Reşt-Gîlan, Mazenderan, Xorasan, Herat û Hindîstanê belav dibin. Mirov dikare Xaneqîn û cîhên din jî li vê zêde bike...imkan û derfetê me niha bi sînor in û em nikarin

hemûyan tespît bikin; lê, yen ku hatine tespît kirin, emê li ber çavên we raxin, ku ji vê belavbûnê wêneyek derkeve holê.

Li Navenda Anadolê federasyona Reşİyan ji wan êlana pêk tê: Berkatî, Bilikî, Cûtikî, Celikî, Mifikî, Molikî, Nasirî, Oxçî, Omerî, Sêvikî, Sêxiki (Şexbilan), Xelikî ne. Êlên dinjî ev in: Canbeg, Şexbizin-Lek, Şadı, Rûta, Mikaîlî, Têrikî, Zerikî, Sewêdî, Milan, Badilî, Pisî, Dimilî-Zaza-Qilorî, Sidûni, Doykan, Hêcibî, Atma, Bazikî, Şexan (Haymana) ne.

DîroknûsêKurd M. E. Zekîdi pirtûkaxwe yabi navê"Dîroka Kurdistan" de ji bo Kurdên li Qonya, Enqere, Sakarya û Sêwasê dibêje: Di dema Selim û birêvebirên din de û ji ber sedemên navxweyî hatine. Lê ez sedema ji ber şere navxweyî hatine nabînim, bi piranî ji ber zilma Osmaniyan hatine. Zekî, êlan wiha dest nîşan dike:

Rewşa wan ê civakî

Şex Bizinî 120 malbat in, bi Kurmancî dipeyivin û milekî yên li

Kerkukê ne.

Hecîbanli 300 mal in, ji Miliyên Hecîmanli ne, li rojavayê Qeyseriyê dijîn.

Xatûnoglû 400 mal in, ji Miliyên Qerecdaxê hatine, li bûşure Yozgatê dijîn û nivkoçer in.

Mahasî 300 malbat in. Nêzîkî Qirşehîre rûdinên û ji Mila ne.

Umranli 800 mal in, ji Mila ne û li rojavayê Qirşehîre rûdinên.

Bereketli 10 hezar mal in, li başûre Qir§ehîrê rûdinên.

Tabûroglû 300 mal in, li bakûrê Qirçehîrê rûdinên, nivkoçer in.

Şex Bizinî Li Rojavayê gola Qoçhîsarê rûdinên.

Cûdikanli 200 mal in, li başûre Qoçhîsarê rûdinên, nivkoçer in û tê texmînkirin ku ji Cûdî hatine.

Halkanî 400 mal in. Ji herêma Kalifanî ya Rewandûzê hatine.

Sifkanî 500 mal in. Li bakûrê Halkaniyan rûdinên.

Nasirli 700 mal in. Li başûre Enqerê-Qerealî rûdinên.

Tirikan 400 mal in. Li rojavayê Enqerê rûdinên.

Etmanîkan Ji Etmanîkên aliyê Bedlîsê ne, nêzîkî Enqerê ne.

Zirikanli 500 mal in, li rojavayê bakûrê Enqerê rûdinên û beşekî ji yê Xinisê ne.

Cihanbeyli 5.000 mal in, li rojavayê bakûrê Enqerê rûdinên. Beşekî li Haymana beşekî jî li Akşehîre rûdinên.

Lek 1000 mal in, Li Ardalanê-Leylakê dijîn. Lek Ji Şîrazê hatin û li Salmaz dijîn Beşek ji tespîtên rehmetî Zekî rast in; lê îro cîhê hinekan hâtive guhartin

û gelek jî bi kêmasî ye. Piraniya Şexbizinan Kurmancî dizanin lê zaravê wan

Lerî/Lekî-Lorî ye. VVekî ku rehmetî diyar dike, Lek li Erdalanê û Salmasê

dijîn. Lek û Şexbizin yek e. Hecîbaniyan re ji îro Hêciba te gotin. Xatûnoglû îro nişterîh in. Berkatî ji Reşiyan tên hesibandin. Cûtika îro nişteclh in, lê ti têkiliya wan bi Cûdî re nine. Tirikan di esas de navê xwe Têrika ye. Zirikan wek Zerîkî, Cîhanbeylî jî wek Canbeg tên zanîn.

Gorî nûserê herêmî Xelîl İbrahim Uçak jî, li Anadoliya Navîn; ela Mo¬dan, Şex Bizin, Kallaç, Têrkan, Rişvan, Mikail, Şihan, Şerefli, Cambek hene û Şexbizinî li 29 gundan belav bıine. Kalaç û Şerefli nizanim kîjan êl in û êla heri mezin jî Reşî ne. Bi dîtina Cevdet Turkay di dema Osmaniyan de êlên li dore Haymanê vviha belav dibûn:

Qerekeçîlî Amed, Balıkesir, Sîwerek, Haymana,

Birecik, Kütahya, Merdin, Gördes, Rakka Tirkmen

Yuzukûtlû Haymana, Aksaray, Sêvvas, Qirşehir, Qoçhîsar Tirkmen

Boynu inceli’*' Qonya, Qereman, Bozkir, Hecîbektaş, Edene,

Mereş, İlgaz, Nevşehir, Develi Yoruk

(*Ji êla Boynû-tncelî û taîfa Tirkmenên Darıişmendî ne. Zozanên xwe Dewelî û Erci- yes in. Zivistanan jî Ii Aksaray û Qirşehm bûn. Ewên li Nevşehîre bi cîh bûn Qaraca Kurd, Hereklî, Savdli û nefs-î Boynû İncelî û 10 êlên ji wan peydabûyî ne. îro em nizanın ku Qerekeçîliyên li Haymanê bi kîjan navî ne? Êlên din en Boynû İnceli û Yuzıikûtlû jî nizanin kîjan in).

Cîhanbeg Erzirûm, Meletî, Enqere, Kütahya, Qers,

Çildir, İlgaz, Sêwas, Xarpût, İskilip,

Akşehir, Qonya, Bozok, Amasya, Çorum,

Qastamonû, Rakka, Çêrmûk. Ekradê Konar-koçer

Haymana, Kengirî, Ergûvan, Xarpût,

Adana, Çerkeş, Sencaxa Üzer. Tirkmenên Koçer

Rakka, Erzirûm, Qers, Çildir,

Sêwas,Haymana, Qoçhisar, Qereman,

Kocaeli, Biga, Rûmelî, Balikesîr. Ekrad

Meletî, Enqere, Rakka, Halep, Dîlok,

Kirşehîr, Tosya, Mereş, Nîzîp, Birecik,Sîwerek,

Sêwas, Qonya, Şam, Kilîs, Çorûm, Erzirûm,

Besnî, Zîle, Qeyserî, Bozok Konar-Goçer Ekrad

Enqere, Çanqiri, Qonya, Bozok Ekrad

Sêwas, Mereş, Qoçhisar, Kirşehîr,

Nevşehir, (VVeranşar-Torbali)

Amed, Aksaray, Aydin, Soma,

Çanqiri, Qonya, Kütahya —~

Kütahya, Iskîlîp, Palu, Geyve, Haymana,

Mêrdîn, Çanqiri, Rakka, Amed,

Erzirûm, Qastamonû Ekradê koçber

Erxanî, Haymana, Meletî, Qonya, Mereş,

Kirşehîr, Mûcûr, Sêw'as, Çerkeş, Kütahya,

Rakka, Erzirûm, Şarkî Qerehisar Ekradê koçber

Ew êl û federasyonên ku nivîskar li jor hejmartine bi tevahî Kurd in û ez piraniya wan ji nêz ve nasdikim û bi hinekan re xisimatiya me heye. Di Kurdbûna wan de ti guman û şik nine, kesek nikare vê îddea jî bike. Wekî

nivîskar dibêje ew Yoruk in, ne raste. Tırkmenbıma wan jî raste, le bi wata ku min di destpêka vê pirtukê de gotiye; ne ku wekî mebesta nivîskar bi wata Tirkbûne ve!

j

Di deftêra Enqere Tahrîr a ji sala 1463 an de mayî, girêdayî Enqerê Kizilcihamamê (Yabanabad-Çamlidere) gundekî bi navê "Kurtler" derdikeve holê. Gor vê deftere ew grind di sala 1463 an de 35 xane ye, 1523-30 an de 32 xane û 18 bekar; di sala 1571-72 an de 65 xane û 2 mucerred e. (17ÎM1) Mirov dikare vî gundî, di fermiyetê de gundê yekemîn hesab bike, lê berî vî gundî jî bi sedsalan gundên Kurdan li Anadolê hebûn. Ew bi navên cûda û bi navên hatî guhartin derbas dibin. Em baş dizanin ku piştî sala 1000 an Kürden Koçber li Anadolê koçer, nîvkoçer û nîştecîh in.

Dr. Celîlê Celîl ji dîrokzanê Ermeni Incîciyan radigihîne, ku di sedsala XVÏII an de li aliye Mûşe ev elana hebûne: Ban Çinarî, Sînanî, Batikî, Şatkî, Sîpkî, Hasnî, Berazî, Mimanî, Omirî, Şexbizin. Tê gotin ku di çiyayên Erzirûmê de 1500 malbatên Şexbizinî û Sewêdî ji dijîn. Ji wan ên ku nûser dinivîsî Sîpkî, Şadî, Omerî, Berazî, Şûxbizinî li navenda Anadolê hene. Eger bûyîna Sewêdan raste, ew jî li Anadolê hene. Dîsa beşen wan em li Arran, Erzirûm û Ezinganê jî dibinin. Torî li ser wan agahiyan dide. Elên li Azerbaycanê ev in; Rawadî, Celalî, Milan, Radran, Reşî, Seklûz, Lek û Gardavarî ne. Evên ku li bakûre Wan, Çorûh, Bedlîs-Mûş, Erzirûm û Ezinganê jî: Pendhan, Seylokan, Şeker, Ez, Loian, Hesnan, ïsavî, Cebran, Belikan, Memekan, Zirikan, Reşî, Bazik, Gerdî,

Pizyan, Şexhbizinî, Zeylan, Şadîr, Başman, Hemdîgan, Manûran, Haydaran, Yezidi û Adaman in. (38) Ji wan gelek êl hîna jî li Anatoliya Navîn û Anadolê dijîn. Dîsa di nav wan Celaliyan de em beşekî parçên wan

li Anadolê jî dibinin. Ji wan Xelika û Biiika di nav Reşiyan de xuya dikin û li navenda Anadolê dijîn:

Celalî:

El

Xelika n Sakyan Balhekan

Misirkan û Banoka Cenûkya Hesê Soran Qizil-Pasih

Bi dîtina min Balhekanên derbas dibin Bilikî yen li Qonya ne; Cenûkya jî Cûtîkî ne û Sakyan jî Saka ne û ew girêdayî Reşiya ne. Li Xorasanê jî gundekî bi navê Xelikan heye ku min ziyaret kiribû û Hecî F.lî Esker Xanî digot "em Xelikî" ne.

Wekîl Mûstafayev dibêje: Celalî dibin du beş: Yek Sêvikî yek jî Celali

ye.

Bahaeddînan, Cemaldînan, Hesenan, Bîndanan bi Harbendelî, Bad illi, Mamavî, Bozkoyûnan, Anteran, Koçûr Avşar, Güneş û Omerî girêdayî Milan in. Di sala 1711 an de li dora Qers, Erzûrim û Çildirê hatine bi cîh kirin, lê piştre hatibûn dora Amed û Merdine. Kiliç, Pirol (Pirdil) Tacir, Bektaşan jî hatibûn Heleb û Mereşe. Ji bo ku wana dîsa vegerin cîhên xwe yên berê waliyê Rakka Huseyn Paşa di 1730 an de ji hemû kesên eleqeder re ferman şandin. (9Ü'

95)

Waliyê Ezinganê yê kevn Ali Kemali, di sala 1930 an de pirtûkek bi navê "Ezingan" nivîsandiye; di vê pirtûkê de jî mirov dibine ku rêvebirên dewletê bi çavêkî çawa li Kurdan dinerin û çiqas li dijî Kurdan nijadperest û faşist in. Ew kes bi navê dîrok nivîsandinê heqeratan li gelê Kurd dike û kina xwe vedireşe. Em nikarin di teraziya wan kevin, em miletekî esil in,

ji gelan re ti dijminatiya me tune. Ji bo ku pirtûk kevne û di cîh de lêkolîn li ser hatiye kirin, emê cîhên bi istifade bi xizmeta we kin:

Şeni Gundên lê rûdinên

- Başkoy
- Cibo
- Geylan
- Kolanli
- Kizil Çûbûk

174 Hunzan

72 Kari kom

- Sanûcak
- Şarûk
- Şilikan
- Zirzanos
- Dimlek
- Dizmori

1756 Qereliyan

1108 7 gund in

3188 15 gund in

2002 7 gund in

1610 9 gund in

Kemali tine ziman ku ew êl ji Şadiyan veqetiyane. Bi ditin a min jî ew êl hemû di bin sîwana dewleta Şadiyan de gihiştibûn hev. Wek em dizanin beşekî mezin ê Şad i yan û hinek Canbeg jî li Xorasanê rûdinên.

Di nav konfederasyona Mila yê ku li Serxetê û Binxetê dijî de gelek êl hene; ji wan hinekan parçên xwe li Anadola Navîn in. K. Yeşîloz wan wiha radigihîne: Di nava Milan de êlên mina: Têrikan, Nasiriyan, Çûyereş (Çûxreş), Mirdêsî û Canbeg jî hene. (39) Ji wan navê Çûxreş balkeşe. Min li destpêka pirtûkê jî nivîsî bû, ku li ser kevirê ji Alallah derketî de agahîyên ji salên 1650 BI de manî û navê Çûxreşiyan jî hatibû nivîsîn ku ew hîna jî hene û li dora Hatay/Sûriyê dijîne û pismamê Reşiyan e.

Oxçiyan Oxçiyan Qe rebaş Sêvkar Çarikli Giransor Bilice

Kureyşanli Hormek Seter Karsa ni i Kimsorlû Maskanli Çêkanli Kamhût îzolli Şavalyan Kir

Maksûdanli Çerkeş

Wan êlana jî bi yen li Dêrsîmê ve girê dide. Di navça Mazkirtê de jî gelek elan bi nav dike û yen ku ji bo me girîng Yûsûfane û dibêje qebîla xwe jî Gevran, Şexbizinî û Mila ne. Hejmar 1330 kes in. (25) Sêvika û Oxçûyan li na- venda Ana d olê jî hene. Sêvika li Xorasanê jî hene. Kemalî êlên weder dike du beş: Şâx Hesenî û Dêrsîmî. Evên girêdayî Şêx Hesen jî du beş in: Seydan û Şêx Hesen. Ji Seydan yan jî Koçûşaxı hene ku ev jî sê beş in: Koçûşaxi, Reşikûşaxi û Şamûşaxi (Ovacik). Êlên Dêrsîmê jî beşek jê wiha ye; Izolî (Mazgirt), Oxçiyan (Kîxî), Rûtanli (Bahtiyarûşaxi-ev li Xorasanê jî hene û emê li ser bisekinin), Alanî (ji Xorasanê hafine), Demenanü ji Xorasanê hafine. (25) Koçûşaxiyan navê xwe ji Beraniyan wergirtine û dûmahiya wan in; ku bi Reşî û Şamliyan ve ji kokekî têne û berê jî me qal kiribû. Ew êlana giştik di nav Çemişkezegiyen Xorasanê de jî hene.

Bi qasî Kazim Yeşîlgoz radigihîne piştî belavbûna Beraniyan, êlên ku nexwestin xwe bi Pezgewran re girêbidin belav bûn. Beşek jê çû Xorasan û

ketin bin birêvebiriya Tîmûr, beşek jî berbi rojava çûn. Ji wana yek jî Çaxûran- Çakanlar bûn ku gelek alîkarî bi Qere Yûsûf re kiribûn û li Ezerbeycan (Erdebîl) war girtibûn û hatin Qerekoçanê. Ew ji Kurdên Sadie bûn. Oxiyan (Oxçûyan) jî girêdayî Kurdên Qefqasê yen bi navê Sadie tên nasîn bûn û ew hîna jî li

Tepê hene.n9)

M. Kalman agahiyên eceb dide: li Dêrsîm-Mazgîrtê êlên mina Alan-Kurmanc (350 xane-li Nazimiye 26 xane-Zaza) Şadî (598 xane), Şexbazan-Kurmanc; Li Ovacikê Pezgewran/Kevan-zaza; Reşikan/Kocan-zaza; li Pertekê Halikan-zaza hene. (15l l79) Wekî em dizanin Alan Zaza ne, Şexbizinî Ler, Xelikî Kurmanc in. Reşiyen Zaza jî hene. Gelo ew tenê navên wek hev in, yan jî ew êlana tevhev bûn û hinekan zaravê yên din fêr bûn? Alanên zaza (li herêmê Alîz jî tê gotin) di navbera Dêrsîm, Nazmiye û Mazgîrtê de hîna hene û di günden mîna Gomemîş, Kortesor, Pax, Xezerî, Kocakoç û yên din de ne, ku nêzîkî 20-30 gund in. Di şen? Dêrsîmê de em dibînin ku arteşa Tirk cîhên êlan tespit dike. Gorî vê: Li Qers-Tûzlûcayê; Rûtikan û Cûtûkanî hene. Li Eleşkirte, Şadî, Badili, Barzan (gereg ev Berazî be) hene. Li Patnosê: Sîpkan; li Bazîtê Xelikan hene ku hejmara wan 3842 kes in û 700 kes bi çek in.<44> Ew êlên ku navî xwe derbas dibin hemû li Anadolê jî dijîn.

Li Edenê-Kozanê pêne gund hene ku navên wan: Aslanli, Hayvali, Hacilar, Uç Dût, Hamam in. Ew Kürdana ji êlên mîna Kiliçli û Afşaran in. Gundî dibêjin ew ji Xorasanê hatine û ji êla Lek û Kirintiya ne. Li Afganistan, Tirkiye û Iranê jî ev êl hene . Wek tê nivîsandin di belgeyên Osmanî de Lek, Haciyan û Karnitlû.<49) Bi qasî ez dizanim ew êl girêdayî Şâxbizin-Lera ne.

Li bajarê Wanê jî neh êlên mezin dijîn; Nimiran, Bililan, Mehmûdî; Denbili Beht, Mamî Rişan (li kela Hoşabâ dijîn), Pazûkî, Beradost, Rozkî-Rojkî,

Roçkî (du qebîle ne, Balbaşi û Kûvalisi). (8) Têkiliya Mamî Rişan û Reşiyan h eye.

Li Helebê jî 27 êl hene û wanê li eyaletê Mereş, Heleb û Riha yê dijîn: Reşî, Rişvan, Qere Bezîkî, Karik, Okçezenî, Mûsûbeyî, Simarî, Çimkanî, Malbî, Şêxan, Turun, Bameriyanî, Şakakî, Berazî, Hinanî, Cemaldinî, Kûmankiş-Kemankeş, Şerfanî, Selîfanî, Ohyanî, Ekradîcûm, Kasri Ekradî, Bizik, Berazî Danel, Biracûn ekradî, Berazî Bakan, Elbeyî. Di nav wan de Reşî pir bi qedir tên hesibandin. Berazî li ser kaniyên Firat dijîn, çandiniyê dikin û piraniya wan êlana ne misilman in. Êlên mîna Ekradîcûm, Kasri ekradî li navenda navça Harmê bi cîh bûne. Bizik, Daneî, Bakikminc û Elbelî li kêleka milê Firat bi cîh bûne. (8) Piraniya wan û eşîretân li çiyayên Elazîzê dijîn, jiyana xwe mîna jiyana êlên Ezîdî yên li Sîncarê ye. Iro jî li dora deşta Amîkê gelek êlên Kurd hene ku parçên xwe li navenda Anadolê ne. Dîsa li Lazqiyê êlên mîna Zirikan, Abadli, Koçan, Şêxanî, Mamlê û Mûşane hene. Dîsa li Hama û Hurnusê jî gelek parçên wan Kurdan hene, lê zêde agahî li ser wan nînin. Dibe ku gelek ji wan asîmîle bûne.

Navça herî zêde koç girtî Semsûr e, di sala 1516 an de kete nava sînorên

Osmaniyan bişûnde, qeyda nifûsê yekemin pêk hatin. Di sala 1519 an de 28 tevgerên koçberiyê qeyd bûne. Yen ji Gergerê batine di dora yekemin de ne. Çar xanên Durzî jî hene. Di sala 1524 an de 26 xane hatine. (l09'101) Ji vê demê heta roja îro li Semsûr û navçên wê gelek êlên Kurdên ku parçên xwe li navenda Anadol û Xorasanê ne hene.

Êlên li Semsûrê:(85 S2)

1. Bereket
2. Payamli Huseyn
3. Berehat
4. Cûyban

5. Ris van
6. Dikan
7. Xelikan
8. Kavi
9. Çelîkan
10. Komur Kawî
11. Zerikan
12. Muzikan
13. Zaxfena
14. Turogan
15. Rûmyan
16. Secan

Cemeetên li Semsûrê:<8S 53)

1. Belikan
2. Qeler
3. Bereket
4. Komur Kawî
5. Çelîkan
6. Benam
7. Çûdikan
8. Hoşnîşîn (Reşî)
9. Xelikan
10. Koseyan (Reşî)

11. Mahyan (Reşî)
12. Mirdêsî
13. Nasirî
14. Okçûyan
15. Reşî
16. Rişvan (Badilî)
17. Rûmiyan (Reşî)
18. Sevir (Sevika)-Reşî
19. Sinik-Senek (Reşî)
20. Sevkan
21. Şexbalan
22. Zîkokan (Reşî)
23. Zerikan
24. Diranan
25. Dimişkan
26. Hecîlar
27. Qere Şexan (Bexdilî)
28. Kaskan (Milan) (ji nava 50 heban me girtin. Ji bilî wan êlên mîna Cûtikan, Xelikan, Terikan jî hene).

Besnî:(85'54)

Êla Reşî, Atma hene; Cemeet jî ev in: Bexdilî, Kawî, Mirdêsî, Rişvan, Kurdu, Reşî (Bexdilî) û Oymak a Terikanê heye.

Gerger:

Elen Rûtan, Reyhan, Kawî, Canbeg, Dirêjan û civata Mirdêsî hene. Kahta/Kolik:

Elên Malkanî, Kawî, Rûta, Zerîkî, Canbeg, Izol û civatên mîna Zîrokan (Reşî) hene.<85"55)

Gor Mûstafa Sûcû jî ev hene:(l20',ü)

Semsûr (Navend): Bereketi, Kawî, Komur Kawîsî, Payamli Huseyn, Rişvan, Rûmyan, Tirkoglû, Belikan, Dimişkan, Hidirsor/Hizirsûr, Mûsûrkan, Şexbalan, Hinût, Hamzeyîn, Rûtan.

Besnî: Çakal/Çakalli (koçber in), Rişvan, Dêrîk, Alîşîr, Arap, Mansûr, Bayat, Koseyan/Keseyan, Hesenan, Mehman, Atma, Iza, Besnî (Çerkez), Afşar, Qerelar, Oyrat.

Çelîkan: Çelîkan, Bistikan, Qeler, Bûxara, Abdulharap.

Gerger: Kerker, Kawi, Mûsaoxûllari, Reyhan, Alkeçî, Merdisî Golbaşi: Çelîk, Haciyan, Nasirî.

Kahta: Mûlûkan, Merdis, Kawî, Bezikî, Alût, Izolî, Gevûz.

Samsat: Bazikî/Bazûk, Merdisî, Hecîhalan, Arap, Sînanli.

Sincik: Halikan, Hamzakan, Sinikan/Senek, Çûkan, Arnût.

Tut: Avşar, Kasikan. (12ü ll) Wekî ji wir jî xuya dike, gelek êlên li Anadolê parçên xwe hîna jî li Semsûrê hene. Ne tenê ew, mirov dikare wan êlana di nav piranî rêxistin (Saka, Şadî, Germiyan, Beranî, Celalî...) û serhildanan de jî bibîne.

Li navça Semsûrê Sincikê em rastî êl û têkiliyên muhtemel ên ecep tên. Yek ji wana êla bi nav û deng a Qereçorî ye. Ekrem Izî dibêje: Baş nayê zanîn ku ew kîngê li Sincikê bi cîh bûne, lê îhtîmaleke ku di sala 1691 an de bi cîh bibin. Qereçorî li Palûyê sê bira bûn. Vana: Memo, Mikaîl û Maksût bûn û li ser erdê şer kirin û du kes kuştin. Welatê xwe terk kirin û

hatin Kolikê/Kahta cem serokê Reşiyan. Wî jî li bakûr herêma çiyayî (Sincik) da wan.1121'4’1 Li vir

mirov dixwaze bipirse gelo Mikaîliyên li Haymanê ji wan Qereçoriyane? A. Korkût jî dibêje, di navbera 1650-1700 an de bi cîh bûn. Salnama Mamûrat ûl Azîz li ser Reşiyan wiha agahı dide: 12 êl girêdayîne: Taşil, Tişîl, Kawî, Cebel, Mahacan, Taşikan, Alikan, Aşaxi Keller, Y. Keller, Qereçor û Komik in. Di sala 1536 an de ji bo Reşiyan tê nivîsîn ku 10 êlên bi hev ve girêdayîne. Di nava wan de Qereçorî û Alikan nine. Ev jî dide xuyakirin ku di sala 1536 an de hîna jî Qereçorî nehatine Sincikê. Qereçoriyên li Sincikê dibêjin "Em Reşî ne". (12M6) Dibe ku Mikaîlî yen niha li Haymanê ji Sîpkan yan jî Qereçorî zû veqetiyabin û hatibin herêma Semsûrê. Ji wir jî bi beşekî Reşiyan ve çûbûn Anadolê. Levvra gor qeydên di sala 1536 an de Qereçorî ne girêdayî Reşiyan e, ew jî dide îspat kirin ku ew ji deren din hatine. Piraniya Qereçoriyan li cîhê Aras û Kür digîje hev de û li Xorasanê dijîn.!12!127) Gor tespîtên A. Caferoglû di sala 1966 an de li herêma Nişabûr û li dora Cûmeynû Esfaraînê nêzîkî 130 hezar Qereçorî hene. Di sala 1980 an ev hejmara gîhîşt 200 hezarî. (121125)

Pinarbaşi-Taxa Jêr / Kolik

Dr. Fritz êlên di sînorê Tirkiye de gorî sîstema birêvebirinê beş dike û

gore ve dibeje elen giredayı bajare Amede nezıkı 50 heb in; li gorı nivıskaren

din jı nezıkı 72 cin e. Dr. Fritzı ew dijmere u dibeje çend ji wan niha tunin. Em

çend binivısmin: Zorkı, Soydı, Korkı, Garizan, Dirmagarı (niha nın in); Şakakı,

Miran, Kumya, Celkı yan jı Çelkan, Brası (Berazan), Şex Bezim, Maskı, Reşkı-

Reşan-Reşı, Bilan Ew elen li vir piranı koçer in u piram zivistanan diçin

aliye Riha û Bexda ye. Hinek ji wan jı koçı Helebe dikin, ji wan elana her çar

qebîle Korkillı ya yekemin li navça Korkil dijın. Ev elen li ve heıeme dijın di

çandiniyê de gelekî bi pâşketîne u bi Ermeniyan re reqabete dikin.

*

Reşiyen Konyayê

Heta vir me gelek alî û cûreyên êlên parçebûyî dan, lê wekî bê texmîn kirin ne tenê ew in û mumkune ji wan jî zêdetir me nikariye tespît bikin an jî binivîsînin. Ji yek van parçeyên ku herî zêde lê dijîn jî Xorasan e. Wek tê zanîn di bin mêjiyê gel de dema Xorasan tê gotin Tirk tên bîra mirov û yên ji wir hemû wek Tirk tên pejirandin. Bi taybetî jî li bakûrê Kurdistanê û Anadolê ew yeka bi vî rengî ye. Lê dema mirov ji nêzve lêdikole û bi awakî pir zelal eşkere dibe, ku ew têzeka li ser derewan ava bûye û Xorasan ji hezaran salan vir ve war û wargehê Kurdên li dervayê welat e.

KURDÊN XORASAN Û GÎLANÊ

Heta vir min hewl da ku cîhên Kurd lê belav bûne raxim ber çavan, ji bo ku Kurd li erdnîgariyeke gelek fireh belav bûne, zahmete ku mirov di şerten îro de bigihîje hemûyan û agahiyên ji sedî sed rast û konkret bide. Ji van Kurdên belav bûne komên herî zêde ye, li Anadola Navîn û Xorasanê bicîh bûne. Lmê di vê beşe de bi kurtî qala Kurdên Xorasanê bikin, Qala wan gereg bibe pirtûkek serbixwe, lê ji bo ku dîroka Kurdên

koçber bi giştî bê fehm kirin em neçarin bi kurtî bidin. Lewra hemû bihev re girêdayî ye û hevûdu temam dikin. Ji bilî wana, li Afganistan, Belûcîstan û Hindîstanê jî Kurd hene. Min hewl da ku herim cem wan jî, lê mixabin bi serneketim. Gor agahiyan êla bi navê Brahoyî li Belûcîstanê û li bakûrê bajarê Lyg-Ketata dijîn. Serhejmara wan 300 hezar e û wek koçer çûne wir. Li eyalata Hindîstanê ya bi navê Sind jî dîsa Brahoyî hene û hejmara wan 48 hezar in. Gor Morgonîstrîn ê rojhilatzan, li Herata Afganîstanê jî Kurd hene. Tê pejirandin ku ew ji Xorasan yan jî ji Ta- cikîstanê çûne. Ibn Haldûn qala du êlên mezin ên li başûr dike ku navê wan Loyen û Tabir e û ew di dênia Moxolan de hatine. Bê guman pêdiviya wan bi lêkolînên firehtir heye. Hêvîdarim rojekê dîroka wan jî bê ronî kirin û têkilî bên dayîn.

Di dirêjiya vê pirtûkê de me car caran qala Xorasan, Kurdên Xorasanê, Xorasan welatê kê ye, hatin û çûyîna wan kir; bi kurtî mirov dikare bibêje: ku Kurdên ji ber sedemên cûda ji navenda Xorasanê hatine li rojavayê Bakûrê Kurdistanê û Anadolê bi cîh bûn şûnde jî, ola xwe ya kevn û kevneşopiyen xwe berdewam kirine. Ola wan Zerdeştî û olên di bin navên cûda vên girêdayî Zerdeştiye de bûn. Avcioglû ji bo ola wan "Ehlî-Heq" bûn dibêje. Li ser bingeha olî ew hêzên Kurdan xwe li hember dijminan birêxistin kirin. Navê yek ji wan rêxistinan Beranî bû. Dewleta Beranî li ser esasên ola Zerdeştiye ji alî êl û federasyonên êlan ve hatiye damezirandin. Berî wan jî mîrîtiyên din ên mina Germiyan, Qeremanî û yen din hebûn ku min qal kiribûn...Bê guman Beranî xeleka herî girînge. Lewra, piştî belavbûna wan ya di sala 1467 an de em dibînin ew rê li avakirina dewleta Safewî vedikin. Yan jî bi navê xwe yê esasî dewleta Sersoran (Sûrhûser, Alavî). Girîngiya Beraniyan ji vê tê: Elên di nava vê dewlete de misilmantî qebûl nedikirin. Yen misilmantî pejirandin Pezgewr damezirandin û di nava wan de xwe bi rêxistin kirin. Ji bo wê,

ew hêza ku ola nû nepejirandî di dewleteka nû de xwe derxist pê§, yan jî bi awayekî nû xwe bi format kir. Di nava vê dewletê de jî ola wan hinek din hate nerm kirin û hîn zêde nêzîkî Islamê bû; ji berku, taqeta tekoşîna wan ê li hember misilmanan nemabû û îslam bûbû hêzeke emperyal. Ji bo wê eger mirov bêje ku dewleta Sersoran li destpêkê dewleteka Kurd bû, raste û di cîh de ye. Gelek jeder didin xuyakirin ku kalê Şah Ismaîl, Şex Cüneyt di dema dawî de serokatiya Beraniyan kir û tekê/ocaxekî wî li çiyayên Gîlanê hebû. Beşek ji Kurdên îro li Xorasan bi dewleta xwe li ser esasên olî hatibû avakirin re vegerîn Xorasanê.

Evv cîh ji Kurdan re ne xerîb bû, lewra kalên wan jî ji wir hatibûn. Hîna jî çîrokên wan yen hatibûn qalkirin di guhen wan de bûn...Lê divê ev niqte jî bê zanîn ku Kurd berê jî li Gîlan hebûn. Yanî beri Sersoran. Ji bo wê Kurdên Xorasan bi wan ve di demên cûda de çûne. Beşek (Emarlû) ji yen li Gîlanê piştre ji Xorasanê anîn û li wir hatin bicîh kirin.

Gor FaikBûlût ji K. Tewahûddî radigîhine, Kurdên Xorasanê di sê caran de hatine koçber kirin. Bi dorê di dema Şah İsmail, Şah Tahmasb û Şah Ebbas de hatine koçber kirin. (36) Êla Qeremanî di dema Şah Îsmaîlê Safewî de, ji bo parastina (berewaniya) tixubên Xorasanê anîne wir. Paş vê bûyerê, cîgirên Şah Ismaîl jî ew siyaset domandin û Kurd ji cihê bav û kalê wan koçber kirine

Bi dîtina min jî ew raste. Lê pêwîste em Kurdên li Gîlan û dora derya Kesk ji wan cüda bifikirin. Lewra dem a Şah Îsmaîl hîn biçûk bû di nava Kurdên li wir de hate veşartin, vane Kurd ji bere ve li wir hebûn. Yeke jî, di cîhê gotina: ewën di dema Ş. Îsmaîl çûyînî de, ez dixwazim bibêjim ewên ku dewleta Sersoran damezirandine. Bi taybetî dumahiyên dewleta Qereman û Kurdên din ên (wekî ewên bi navê Rumiyan têne nasîn) li rojavayê Kurdistanê û Anadolê ji ber zilma Osmanî, Moxol û Ereban gelek zi rar dîtin û ji ber vê dîsa berbi rojhilat çûn. Ewên li destpêkê çûbûn di

nava dewleta Safewî de rolên sereke lîstin. Lê vê yekê jî hestiyê pişta Kurdan şikand; lewra, Kurd li ser esasê olî, bûn du-sê beş û bi navên dewletên cûda bi hevre şer kirin.

Dîsa di dema Şah Tahimasb, 1553 an de, êlên Kurd cardin hatin şandinî Xorasan. Di heman salê de iaw'ikê rêvebirekî êla Siyah Mansûr ê bi navê Xelîl, Şah bir Rê/Tehran û perwerde kir. Pa§ê bi navê Xan 30.000 esker da wî û kire mîrêmîranîya Kurdistanê. Ewê aramî pêk bianiya, bacan kombikira ûlihember êrîşên Osmaniyan bibiya hêza mertal. Lê piştî demekê Xelîl guh neda Şah. Şah jî erdê dayı ji dest girt û ew şande Xorasanê. Ela Siyah Mansûr (divê ew Atma û Elxas bin-Ş.R.) ve tev hev li Xorasan xizmet kir. Piştî mirina Xelîl lawikê xwe Dewletyar derbasî şûna wî bû; Sefawdyan jî ew anîn Ezerbeycanê ku li hember Osmaniyan parezvanî bike. Cîhên mîna Kerşeb, Zerînkeme, Secas, Sencan, Sorlûk, Keydar, Şebîstan, Engûran, Kancûka Kor û Jêr Kelêh çêkirin, bajar avakirin û piştre jî serxwebûna xwe îlan kir. Sefawiyan, di serleşkeriya Murşît Kulî Xan Şamlû de, 6000 siw'arî şandin ser. Piştî şerekî mezin Safewî têk çûn. Cara duyemîn, Mehdi Kûlû Siltan Şamlû bi veşartî hat û Dewletyar neçarî teslîmbûnê kir. Sefawiyan Dewletyar û 300 rêber îdam kirin. (in0 3H)Ew bûyer û yen bi vî rengî trajediya dîrokî ya Kurdan e, yên bihevre şer dikin dîsa Kurd in. Yên li ser milên wan, hespên xwe didin lîstikandin jî Pars in, K. Tewahûddî jî dibêje: Di dema Şah Tehimasbê yekan de, Oxlan Bodaq Xanê Çegenî emîrê mezin ê bi nav û deng bû serokê hikumeta Meşhed û dure jî bû yê Qoçan. Hikumeta Esferaîn ji vê demê heya dema Şah Ebbasê yekan di bin fermana Kurdan de bû. Kurdên Esferaîn di dema erîşa Ebdul Mu-imên Xanê Ozbek ku bû sebeba qîrkirina milet û wêraniya bajarê Meşhed; pir berxwedan û parêzerî ji bajarê xwe Esferaîn kirin û bi mêranî û camêrî şer kirin, heya yek ji wana ma li berxwedan. Birc û keleha bajêr ketin destên dijmin. Keçel Qûbad Kelhûr tenê di wî şerû berxwedanê de

sax ma û şere Ozbekan mîna şêr û pilingan kir. Çaxa ew esîr kete lepê dijmin, serdarê Ozbek zanî ku bi §êrê-mêrek mîna wî nikare bikujê, çek, sîlah û kincên wî yên şer je kirin û ji bajêr dûr kirin. Tenê ew Kurda di wî şerî berxwedanê de cane xwe bi saxî xelas kir. Agahiya li ser şer bir Qezwîn ku Şah Ebbas li wir bû. Xebara dagirkirina Esferain û qirkirina milet da wî. (192"25) Di vî şerî de jî mêranî û berdêlên Kurdan dayî derdikeve holê, ku çiqas liberxw'e dane û çiqas şehîd ketine. îro jî hemû înkare; ti nikarî li wî bajarî heykelekî Kurdan bibînî...

Koça heri mezin jî di sala 1598 an de (hinek dîtin jî dibêjin 1593) pêk

hat. Kurdên ji bakûrê Kurdistanê çûbûn li nêzîkî Tehran-herêma Xwar û Ve- ramîn (niha di nava bajar de ma ye) bi cîh bûn. Piştî du salan bi piranî berbi Xorasan ve hatin şandin. Ji wana du hezar malbat li cîhê xwe man û îhtîmaleka pir mezine, ku ew îro heliyane. Tê gotin ku bi giştî 45 hezar malbat (225 hezar kes) bûn, Pasê Nadir Şah ji wana pêne hezar xane şandin sînorên Osmaniyan- Iranê û li Erzirûmê bi cîh kir. Bi \êra, ji bo ku êrî|ên Rûsan bidin sekinandin 2000 malbatên A/Emarlû li Gîlanê bi cîh kirin. Nêzîkî 60 gundên wan li herêmê hene. (3b) Bi vê yekê re girêdayî mirov dikare dema Celaliyan jî daxilî vê bike. Ji ber ku wê demê jî gelek Kurd ji ber zilma Osmaniyan berbi rojhilat çun. Tê zanîn, ku hinek Reşî di sala 1601 an de li Gîlanê bicîh kiribûn. Li ser hejmara Kurdên li Xorasanê gelek dîtinên cûda hene, lê mirov dikare bêje ku ji milyonekî zêdetir Kurd li Xorasanê dijîn. Nêzîkî 1600 gundên Kurdnîşîn hene, ku ii bajarên mîna: Aşxane, Bicnûrd, Cacarm, Sebziwar, Nîşapûr, Şîrvan; Qoçan, Çinaran, Meşhed, Deregêz Ci Kelata Nadîr de dijîn. Dr. Behrewan li vana Cacerm, Xaf, Mane Dilheqan û Ba Xezer (Koma Zengenê) zêde dike.*197' ,2) Zengenê Kurdên em li navenda Anadolê wek Şexbizin binav dikin in. Cîhê wan jî li başrıre Derya Xezer e. Ba Xezer jî gereg ew der be. Ji bill van û Kurdên Goranê ii heman herêmê, piranî bi zaravayê Kurmanciya jor

dipeyivin. Li Kelatê hinek Lor jî hene. Xêr ji wan 5 hezar malbatên heta niha jî bi awakî koçerî di konan de dijîn. îro mezintirîn eyaleta kombûna Kurdan li Xorasanê bajaiê Meşhedû ye, ku tê gotin tenê di nava bajar de 400 hezar Kurd hene. Li wan bajaran û beşek jî li gundên wan geriyam; pir caran di rewsa ew tê de girivên min dihat. Kurd çawa jihev veqetandibûn, çawa bê hêz, perişan kiribûn, çawa mêjiyê wan dişûştin û çawa diheliyan!...Ewên li dora bajarên mezin û yen di nava bajaran de bi tevahî heliyabûn. Bêwîste êdî Kurd vê yekê nepejirînin qedera xwe bixin destên xwe.

Koça bi l^ştiran

Ji bo bi cîhkirina Kurdan li Xorasanê ez ji pirtûka pismamê xwe Kelîmûllah Tewahûddî ya bi navê "Hereketa Tarîxa Kurdên li Xorasan" ku ji heft cîldan pêk tê, wek jêdera bingehîn bigirim û bi piranî tercûma wê peşkeşî we bikim. Bi rastî jî wî şerî karekî pir hêja kiriye û hemû dîrok, çanda devkî û zimanê Kurdên Xorasanê nivîsiye. Gereg Kurdên Xorasanê ji bo kêda ew bazê serbilind heykelekî wî li Xorasanê çêkin. Ji bo vê lêkolînê ez di sala 2001 an û di sala 2003 an de çûbûm Xorasanê. Sala siftê min bi kurmamê xwe Tewahûddî re hevdîtinek pêk anî; ji zîndanê teze derketibû û seva min dil nebû ku ez wêneyê wî bikişînim û vê re hevpeyvînekê pêk bînim. Digot: "ji bo min pirsgirêk nîne, ez teze ji zîndanê derketim, fermana min bi stûyê min ve ye, bila tu bizanî ku hertiştekî min di bin çavderiya dewletê de ye û dikarin serê te biûşînin; ji bo ewlekariya te, eni nekin baş tir e!" bi vê gotinê re, min jî helwesta xwe veşartibû...

Tewahudî (yê di navê de)

Min got pismamê min, lewra em herdû jî ji êlêkê ne û derdê me herdûyan jî tiştek bû; ku dîrok, çanda wî gelî derxin holê û rola wan ên dîrokî bidin ber çavên dost û dijminan... Çi tesadüf! Piştî 400 sali wîji Xorasanê, min jî ji Qonya yê destpê kiribû ku em li bajarê Meşhedû gîhîştin hev. Çi trajedi bû! Piştî çar sed salan pismaman hevdû didît! Kurapê min Tewahûddî jiyana xwe feda kiribû bo Kurdên Xorasanê, mal û milkê xwe bo wan firotibû û dikir berhem. Deng xwes bû, ji me re kilamên herêmî gotin. Mala xwe hemû bi xalîçe, wêne û neq§ên Kurdên Xorasanê xemilandibû. Sala din ez dîsa çûm

male, lê tunebû; bûyera dilê min dax kirî jî min wê demê dît. Keça wî digot: "Ez Kurdî nizanim!" gelo ew çawa dibû?! Şerekî li hember zilimkaran stû xwar nakî û weqas tekoşîn dayî keça xwe bi Kurdî nedizanî! Bi rastî pir heyf bû...Lê mixabin min nikarî vê care mamoste bibînim. Cara dawî min xeterê dabûn ber çavan û sê rojan li dû wî geriyam lê min peyda nekir. Di pirtûkên birêz Tewahûddî de, piştî hemû navên kes, êl û deveran de "lo" heye, min ewna bi piranî bikar neanîn; ji bo ku wî di bin zexta vasayî de ew kara kiribû û hewce nake em jî şaşiya ji neçarî nûva bikin.

Bi cîh kirina Kurdan li Xorasanê

Di sala 997 an de (621+997=1618-bi dîtina min gereg ew sala 1593 an be) Kurd birin Weramîn; hinek dîtin jî dibêjin: du saliya Şah Ebbas (1587-1628) bû ku hatibû ser texte Iranê. Carek din Ozbekan eriş kirin, seranser bajarên Xorasan talan û wêran kirin; qirkirin û bûn sebaba belangazî û bedbextiya miletê herêmê. Ebidil Mûîmîn Xanê Ozbek eskerên xwe kişandin bi şûnde, Şah Ebbas cüret kir ku here Xorasanê. Di hikumeta Xorasan de pir guhartin çêkirin. Bodaq Xanê Çegenî ku mêrekî mêrxas bû û li şâre Xorasan gelek berxweda bû û nehişt ku Ozbek bikevin bajarê Qoçan (Xebûşan). Şah Ebbas ew kir fermandarê Meşhed û nîşana lelegî/lala (mamostê zarokên kralan) yanî kurê xwe Şahzade Siltan Hesen

jî de cem wî, ku zarokê wî bi edeb û mêranî mezin bike. Di wê demê de, carek din Kurmanc di Xorasan de bûne xwediyê hikûmet, leşker û pir karê mezin ketin destê wan.

Dema ku di nava serdarên Sersoran-Qizilbaş an de nehezî û nakokî çêbûn, Şah Ebbas jî ji vê tevlîheviyê qezenc wergirt û du serdarên heri bi nav û deng yên bi navên Silêman Xelîfê Tirkmanî û zavayê wî Murişêd Qolîxan dan kuştin. Bodaq Xanê Çegenî ku xizmê (jin dabûn hev) Murişûd Qolîxanê Qizilbaş bû, ji vê bûyerê tirsiya ku ewa rojekê bê serê wî jî. Bi wê tirsa canê xwe hemû rêkeberên Şah Ebbas mêvan kirin Qoçanê, Şûxzade Siltan Hesen Mîrza ji Meşhed anî Xebûşan û banga milet kir ku guh bidine Şahû nû. Lewra Şah zarok bû, xwe kire cîgirê wî. Şah Ebbas wê demê li başûre Xorasanê bû. Kor Hesen Ustacilo şande Xebûşan ba Bodaq Xan ku wî kari neke, lê Kor Hesen tiştek bi dest neanî û bi destên vala vegeriya cem Şah. Ji wê demê ve êdî Qoçan jî bû paytexta didu ya Iranê û bû cîhê siyaset û rêkeberên Şah Ebbas û hikumeta wî. Di heman demê de Ebdul Mu-imin Xanê Ozbek êrîş anî ser Xorasan û der dora bajara Meşhed girtin (sala 998 qemerî-1580). Şah Ebbas ji alî Qezvîn ve hate Xorasan lê serdarê qizilbaş ku nedixwestin şer bikin, hêvî ji Melê Celaladdin Mihemed Yezdî monecimbaşi kirin ku nehêle Şah bê Xorasan.

Şah Ebbas; mirovekî pir xurifî, serseri bû; pir guh dida mêla, sihêr, nivişt û pîrikan. Dema monecimbaşi jêre got; "Talih û bextê te ji çûna Xora¬san de reş e!" Şah xwe bi nexweşiyâ xist û hate Tehranê û kete nav vexwarin, henek û laqirdiya li ba jinan...

Du Kurdên Xorasanê

Çar meh dor-pêça Meşhed derbas bûn; Omet Xan Ustacilo hakimê Meşhed, alîkarî ji Bodaqxan hakimê Qoçan xwest; di heman demê de jî

Nûr Mihemed Xanê Ozbek li aliyê Deregez dihat bo Meşhed. Bodaqxanê Çegenî ji wê tirsê ku ew negihiştiye Ebdol Muimin Xan erîş bire ser wî. Çaxê erişe de şerekî pir giran çêbû û di destpêkê de Kurdên Qoçan serkeftin û êsîr dane hev çek û sîlahê wan berhev kirin. Lê belê Ozbekan ji ali piştre êrîçek kirin. Şervanen Kurd jihev belav bûn, Ozbekan, Kurd dorpêç kirin û gelek ji wana kuştin. Bodaq Xan û hinek hevalên wî ku hespên baş dibinde bûn cane xwe xilas kirin û reviyan çûn Qoçan. Lê gelek mixabin ku Bodaq Xan nekarî here alîkariya mirovên Meşhed. Ozbek dizanîn ku qasîdê xelkê Meşhede yê li Tehranê tê girtin û Şah Ebbas newêre biçe Xorasanê. Ozbekan bi dilekî rihet çar mehan Meşhed dorpêç kirin, pasê jî bajarê Meşhed girtin û ketin talan û kuştina gel. Weraniya bajêr kirin, xanî xirav kirin, pez û heywan kuştin gelê bê guneh jî pir kuştin. Şairek Irani dibêje: Eger xaka Meşhede bigûvişe çemê xwînê derdiketî heya Kerbala yê here...Deh hezar barê heştiran zêr û zîv û gewherên pir bi biha jî Meşhede derxistin û birin Herat û bajarê Meşhed kavil û wêran bû. Şah Ebbas newêribû were.

Bodaq Xanê Çegenî Xanê Kurd ku ji her alî ve kete ber drîşen Ozbekan bi tenê nedikarî pdşiya wan bigire. Mecbûrî kurê xwe Husên Elî Siltan şande baregeha Şah ji bo alîkariyê. Lê pir mixabin Şah Ebbas kurê wî wek rehîn li

cem xwe hîşt û paş demekê dirêj bi navê xayin da dest Kor Hesen Üstacilo û di sala 999 (1581) ên qemerî de, bi destê wî celadî hate kuştin. Piştî demekê Bodaq Xan jî xwestin û Xorasan vala ma û ji her çar aliyan ve Ozbekan eriş kirin ser Xorasanê û heya Şimnan jî peş ve çûn. Le belê bext li gel Şah Ebbas yar bû. Di sala 1007 (1589) an de, Ebidol Muimin Xanê Ozbek bi destê hevalên xwe hate kuştin û Şah Ebbas ji wê bûyere jî qezenc wergirt û çû Xorasanê. Hi- nek guhartin li wir jî çêkirin, hinek mîr ji kar dûrxistin û hinek jî anîn ser kar. Paşê çû ziyareta Imam Riza, li rêya

Çinaran û Qoçan re çûbû aliyê Mazenderan neçîrê û di heman salê de bû ku Kurdên Çemîşgezek hatin Xorasanê.

Wê demê serdarên artê§a Iranê hemû Kurd bûn, wek Gêne Elî Xan Zîk fermandarê Kirman û rojhilatê Iranê; Xan Ehmed Xan Erdelan fermandarê Kurdistanê; Emîrxan Xanê Lepzêrîn fermandarê Mihabad û ürmiyê; Bodaq Xan Çegenî fermandarê Qoçan û bakûrê Xorasanê û ji aliyê Tehran jî di bin fermandariya êla Celil Qolî Cedîdil Vêrûd Çemişgezik de bû. Şah Siltan Çemişgezik fermandar û mîrê wir bû. Şah Qolî Siltan Çemişgezik, jî Şah Ebbas xwest ku îzna wî bide ku ew here herêma Xorasan serê Ozbekan. Şah Ebbas bi wê xwesteka mîrê Kurmanc pir kêfxwe§ bû, îzna wî de ku herê şerû Ozbekan.

Xorasan bûbû cîhê kêşmekêş, cirîda hespên Ozbekan, di sala 1006 ên (1588) qemerî de, heya Traqê pêşve çûn. Her şûna têde çûn talan û kawil kirin, malê gel ji dest girtin, jin-mêr-zarok kuştin. Husen Xanê Çegenî emîrê Kurd ku emîrê Bestam û Damixan bû, bi hevkariya Mîrza Elî Beg Ereb, serokê polîsê parastinê ku rê diparastin, êrîş kirin ser Ozbekan. Le bextê reş, Ozbekan li peşiya wan kemîn danî bûn û ketin kemîna Ozbekan û hinek hatin kuştin û pir ji wana jî reviyan. Hesen Elî Xan biraye biçûk yê Husen Elî Xan û Mîrza Elî Ereb herdu jî şehîd bûn. Ozbek xurt bûn, eriş kirin ser bajarên Kaşîmer, Damxa, aliyê Alkaya xwar û Bîcqûl Kaşan heyanî beriya îranê ajotin. Simnaniya jî Orîşek ser Ozbekan kir, lê bi ser neketin, evv hinek hatin kuştin, hinek jî reviyan.

Şah Elî Xan Mîr Çemişgezek ji Alkayxwar ew rewşa mal wêran zanî û bi leşkeren xwe vê çû pê§iya Ozbekan û eriş kir ser wan. Çend mezinên Ozbe¬kan hatin kuştin. Heyanî wê rojê ew yek bi serê Ozbekan nehatibû ku hemû reviyan. Piraniya leşkeren wan yan êsîr ketin, yan jî hatin kuştin. Şah Elî Xan wisa riha wan şikand ku ti caran êdî nedivêrîn erîş bikin. Psîkolojiya wan di şer de xirab bû û leşkeren Iranê ku pir tirs û lerz li

hember Ozbekan di dile van de bû, rihê mêranî kete İaşe wan, yan psîkolojiya wan çe bû, êdî ji Ozbekan neditirsiyan... Ew yek bûbû çîrok, di nav gelê Ozbek de digotin: "Ticar neçin nava daristanê, belkî piling an jî §êrek di nava daristanê de welidî be...

Piştî derxistina Ozbekan ji Xorasanê, êla Çemişgezek cîhê wan girt û êdî di Xorasanê de bi cîh û war bû. Ozbekan nedikarî eriş bike, malê gel ji dest bigire û gel bê hikumet bike. Lê Şahe Iranê pir di fikra xapandina Kurdan de bû; ew ji hev dûr dikirin. Hinek birin rojhilatê Iranê. Ji aliyê rojava, yanî Ezerbeycanê, pir ji yekbûna Kurdan ditirsiya. Xanê Lep Zêrîn ew mîr di kela Dimdim a di Geliyê Dimdim de dima, ku li ser rêya Urmiyê û Şino ye. Şah

Ebbas ji Emîrxan ditirsiya û dixwest ku wî bixapîne û bikuje. Emîrxan ew yek dizanî û di kela xwe de rûniştibû û kar barên xwe birêve dibirin. Şah Ebbas erîşî ser kela Dimdim kir, armanca wî Emîr êsîr bike, yan jî bikuje bû. Emîr Xan tam çar salan di nava kela Dimdim de li berxwe de û şere leşkeren Iranê kir.

Siyasetzanê Ingiliz Lord Kîrîzîn dibêje: Şah Ebbas bi tîrekê li du armancan xist: Yek, Kürden ku li rojavayê Iranê şere wî dikirin û sere wî dieşandin xelas bû. Didu, li rojhilatê Iranê ku bûbû keşmekâşa Moxol û Ozbekan xelas bû û Kurmanc belav kirin. Hinek birin rojhilat û hinek jî birin rojavayê Iranê. Kurmancên Xorasanê, êl û zendên Kurdan bac nedidan Şaire Iran û bi serê xwe bûn. Dema şer diçûn alîkariya leşkeren Iranê. Serokên êlên Kurd bi nişana êlxanî hatin nav kirin. Ëlxaniyên mezin serokê êlê, ew nav û nişan Şaire Iran li van serokên êlan kiribûn.

Di sala 1010 an de carek din Şah Ebbas hat bo serdana herêma Xorasanê û leşker kişand ser bajarê Belix; paşû di sala 1011 an de hate aliyê bajarê Çinaran û Radikan û çû bajarê Xebûşan. Hikumeta Deregez jî de bin fermana Şah Qolî Siltan, serokê êl û emîrê Zaferan, her wisa bakûrê Xorasan bi tevayî kete bin fermana Kurmancan. Şaire Iran, serok, rêvebir û emîrên Çemişgezik bi nişana serokê herêmê û Xan bi nav kirin û fikra xwe ji bakûrê Xorasanê ji alî şer, êrîşên dijmin ve rihet kir û berê xwe de leşkeren xwe, li bajarê Alkay gihişte wan.

El û zendên Kurd di rojhilatê Iranê de bi cîh û war bûn. Her tim di fikir û xeyala serbixwebûnê de bûn, ku rojekê bê û ew serî hildin. Dema Nadir Şahû Efşar bû Şaire Iranê, keça yek ji wan êlxanan re zewicî û kire jina xwe. Ji wê fikra ku Kurd bibin mirovên wî û alikariyê bidin wî. Lê dema Nadir Şah berê xwe de Hindistan ku wî welatî bigire, Kurmancan ditin ku meydan vala ma, serxwebûna xwe diyar kirin û dest bi şoreşû kirin. Nadir Şah dema ew agahî bihîst vegeriya welat ku şere Kurdan bike û Qoçanê jî wêran bike. Çaxê Şah gihîşt Xorasan, ûrîş bir ser Qoçan, konên xwe jî dervayê bajêr danîn. Kurdan firsend nedan wî û bi şev avêtin ser kona wî û ew di bin de kuştin.

Bi cîh û war bûna Kurdan ya li Xorasan re rewşa wir hate guhartin. Çawa ku Mûtelivl Şemis dini vise; Şah Ebbas, Şah Siltan bi nişana Emîrîlûmeyra serbilind kir û tixubên axai yanî ji Xarezîn heya Xorasan da dest wî û çil hezar malên êla Çemişgezik ku li wir diman dan barkirin bo aliyê Xorasan ku bikevin bin fermana Şah Qolî Siltan emîr û xanê Çemişgezek ku ew li hemberî Ozbekan şer bikin. Di serdema hikumeta Şah Siltan Husên di welat de tevlihevî û sergêjî çêbûn. Kurdên Axai ku ji dest keşmekûşî û ûrîşûn Ersenicî û Bûharayî westiya bûn, dest bi şoreşû kirin û çûn çiya. Di vê serdemê de herêma Şîrvan û Qoçan, Bicnûrd û Similiqan bûbû cîhê keşmekûş û şeren êlên Kurd li zevî û erd û zozanan. Şere hevdû pir kirin

û cûdahî kete nava milet. Qerexan kurê Mihrab Beg neviyê Şah Qolî Siltan wê çaxê emîr û serokê êla Çemişgezek bû. Elên Kurd ji hev cüda kirin ku şere hevdu nekin. 40 hezar mal ku ji êla

Çemişgezek bu bi nave Zaferan (lo), Şad (lo), Kawan (lo), Umar (lo) û Qereço

(lu) di zevı û erdên Xorasan de belav kirin. Ji Qoçan, Şirvan, Bicnûrd û heya

Çmaran da destê êla Zaferan. Ji Çinaran heya Simliqan da êla Şadı. Kawan

(Kawı) jı bırekirın aliye Meşhede. Ji bakûre Meşhed heya kela Yusif Xan

da bin fermana êla Caniqorban, Kurd li wan şûnan bi cîh û war bun. Paşe,

Qerexan kure wi Samxan Beg kete dewsa bave xwe û şûna wî girt, Dûre

Samxan Beg Mihemed Husên Xan bû êlxanê êla xwe.

Dawet / Xorasan

Erîşa dîleki Kurd a ser Şah Ebbas

Di sala 1014 (1596) en qemerî de, şerekî mezin di navbera Şah Ebbas

u serdare Osmanı Sınan Paşa (Çixaloglu) de li bajare Tebrîze çebû. Leşkeren

Osmanî şikeştin., esir ketin û reviyan. Şah Ebbas, ji bo wê destpêka mezin, şahî

□ cejn dan çekirin. Şah u emıren leşkeran li ser girekî runiştibun û li esıran mê-

zedikirin.. Her serbazekî ku êsîrek girtibû u tanı, Şah lê temaşe dikir ku eğer

ew esir ji mal be taka mezin yan jı nav u nışanek wı hebuva nedida kuştin; yen

reben u be nav û nişan jı dikuştin. Serbazekî, xortekî pir mezin û pir hêja anî

cem Şah. Şah ji esir pirskir ku kı ye, ji kıjan malbatê ye? Xorte êsîr got: Şah ez

Kurd im, ji êla Mukriyanê Kurdistanê me. Hinek emîiên Şah jî Kurdên Mukri- yan bûn, ku navê yekî ji wan Ristem Beg bû. Kesekî ew esîrê bext reş nasnekir. Ri stem Beg dengê xwe kir û got: "Di navbera êla me de nakokî û dijminatî heye, ew xorta jî yek ji wan dijminê me ye." Şah ferman de serbaz ku wî êsîrî bid in Ristem Beg. Lê Ristem Beg got: Şahe min, di navbera me û dijminê me de peyman heye ku em tola xwe ji êsîran heyneynin û ev êsîr e û ez wî nikarim bukujim... Şah bi gotina Ristem Beg xeyîdî û emîr de serbaz ku xort bukujin. Xortê êsîr dema gotina Şah bîhist, xencereka serbazekî bi dest xist û erişi ser Şah kir. Şah li erdê xist, şah deste wî girt ku xencer lê nekeve. Serbaz û leşker û emîrên li cem Şah eriş kirin ser wî xortê belangaz, reben û êsîr, parçe parçe kirin. Ew bûyer di nozdeh saliya hikumeta Şah Ebbas de çê bû. Bi şev Kurdan erîşî ser çeperên Menoçirxan Sipehsadar Şahe Dirûnger kirin. (î(l)

Buyera heri girîng di taliya hikumeta Şah Ebbas de bû, Kurdên Çemişgezik şere Menoçirxan Sipeh Salar hakime Xorasanê kirin. Wê çaxê Emire Kurd Yûsûf Xan Siltan kalê êla Şadî serokê êlê bû. Şah Ebbas di dawiya temenê xwe de herêma Xorasan dabû destê Menoçirxan Sipeh Salar, Kurdan wê demê serî hildabûn û şere Şah dikirin. Tûkoşîna Menoçirxan ew bû ku zorê li Kurdan bike ku guhê xwe bidin Şah û werin bin fermana wî û Şah. Menoçirxan eriş kir ser Kurdên bakûrê Xorasanê û Dirûngerê yen li herêma tixubê Xarezim. Şerek pir dijwar di navbera Kurd û Menoçirxan de çê bû, lê Menoçirxan kela Kurdan ya bi navê Kelata Dirûn girt û ji destê Kurdan anî der. Kurdan şewra xwe kirin, leşkeren xwe gihandin hev û bi şev avêtin ser kele. Menoçirxan kuştin û leşkeren wû êsîr kirin; hinek jî

reviyan. Di wê serdemê de Yûsif Xan Şadî emir û serokê Kurdên Çemişgezek bû. Paş mirina Şah Ebbas ti şer û lêdan li herêma Xorasan çênebûn. (36)

Şere Nadir Şahe Efşar bi Kurdên REŞÎ Û QEREÇOR re

Nadir Şah ji bo şere Ozbekan bike çû Xarezim, birayê xwe Ebrahîm Xan şande cem Mihemmed Husên Xanê Zeferan, ku şoreşa êlên Kurdên Qereçor û Şadî yên dest pêkirî rawrestîne û şere wan bike. Serhildan di herêmên Germexan û Semqan ku dikeve bakûrê rojavayê bajarê Bicnûrd de bû. Mihemmed Husên Xanê Zefaran nedixwest şere êlên Kurd bike û bi Nadir Şah re jî hevkarî bike; dixwest ku êlên Reşî û Qereçor di şer de bi birayê Nadir Şaire bi navê Ebrahîm Xan pîroz bin û bi serkevin. Lê Mihemmed Husên Xan nedixw'est ku şere Nadir Şah jî bike. Ji ber ve yekê jî alîkarî neda birayê Şah û ew bi tenê çû ser Kurdên Qereçor û Reşî. Dema serokên êlên Qereçor û Reşî yên bi navên Necef Siltan û Şukur Beg zanîn ku birayê Nadir Şah di rê de ye û dixwaze bi wan re şer bike. Wan jî tewahiya Kurdên herêma Aladax li hev civandin û leşker kom kirin; şerek pir mezin û giran çêbû. Ebdirehim Xan nedikarî şere Kurdan bike û revî çû kela Yuzbaşî. Kurd li pey çûn û kelehê dorpêç kirin, dor û berên kela Yuzbaşi girtin. Çaxê Ebdirahim zanî ku dê bikeve destê Kurdan, êsîr bimîne bi

şev rêvî çû aliyê Kela Raz. Necef Siltan Xanê Qereçor û Şukur Beg Xanê Bacivan careka din ketin pey bire Nadir Şah û dor bera kela Raz jî dor pêç kirin. Heft roj heft şevan şer çêbû. Ji herdu aliyan gelek kes mirin. Ebdirehman Xan di kelê de êsîr ma û nekarî şere Kurdan bike û çend serok leşkeren xwe jî kuştin ku nekarîbûn şer bikin. Xebera êsîrbûna Ebdirehim Xan gihîşt Nadir Şah ku di wê demê de li deşta Qebiçan xîvet û xergal de bûn, li wir dima. Nadir Şah d izanı ku birayê wî ne meriye şere Kurmancan e. Bi xwe leşker civandin û ber bi keleha Raz ve ketin rê. Şah Qolî Beg yek

ji serdarên wî bû, §andê serê Şukur Beg û Necef Siltan. Di navbera Kurdan û leşkeren Nadir de şerek pir giran çebû. Serdarê leşkeren Nadir Şah, Şah Qolî Beg jî nekarî Kurdên Reşî û Qerçor têk bibe...Nadir Şah hewara xwe ji Şah Tehmasib re kir. Ew jî bi top û tifingên xwe hate alîkariya Nadir Şah. Di wê demê de Kurmancan top û tifingên xwe tunebûn û bi şûr şere tivingê dikirin. Di wî şerî de jî mixabin pir êlên Kurd jî alîkarî dan Nadir Şah. Necef Siltan bi Şukur Beg ve nikarîn şere wan hemûyan bikin û êsîr ketin destên Nadir Şah. Ji ber mêranî û mêrxasiya wan, Nadir Şah, Şukur Beg û Necef Siltan danîn cem xwe, evv ceza nekirin û tiştek negot. Ew bi hürmet û rêz li cem xwe danîn. Şukur Beg, Xanê Baçivan mirovek pir zana û mêrxasekî gelek baş bû, ji ber vê yekê Nadir Şah pir qîmet dayê û paşd jî keça wî li xwe mar kir û bû zavê Şukur Beg. Iro jî di herêma Xorasan de dibêjin ku şer û cengên Nadir Şah pêş de çûyî hemû Şukur Beg sebeb bû, ew yek egîdiya Şukur Begê bû ne mêraniya Nadir Şah. Fia Bacivan îro jî jiyana xwe didomine û bi piranî ji wana koçer in û di çiyayên Ûmaret Qoçan û Şaycan de dimînin û zivistanan jî bardikin herêma Mazenderan ku li wê heiêmê berf nabare.

Ge!o em bizanin çi bi serê Necef Siltan Xanê Qereçor hat. ji Necef Siltan re digotin "Şere Kurd", ji ber netirsî, mêrxasî, camêrî û pehlewaniya wî ev bi vî navî binav dikirin. Dema êsîr kete destê Nadir Şah, Şah pir qîmet, hürmet, rêz û qedra wî zanî; danî ba xwe û dîsa kire serok leşker. Qereçor êl û esîrên pir mezin û bi nav û deng bû ku berî 300 salî ji herêma Wanê hatine Xorasanê. (192 S5> Qereçor bi piranî li alî Qefqasya jiyan, heta wê demê ti agahî negihîştin destê min ku ew ji dora Wanê çûne. Mamoste Tewahûddî wiha berdewam dike: Her tim di dîrokê de bi mêrxasî hatine naskirin. Hemû leşker û serleşkerûn Nadir Şah yen şeren bi Afganan re li Daxistan, Qefqasya û Hindîstanê Kurmanc bûn. Di dîroka îranê de Nadir Şah bi navê Cîhan Gosa (Dinya girt destên xwe) tê naskirin, lê hemû saya

şere Kurd û êlên Kurmanc de bû ku Nadir Şah karîbû ji Qefqesan heta Hindîstan bigre destên xwe. (1y2 S5>

Ji Kurdên Rûsyayê dîroknûs Wekîl Mûstafayev yek ji Kurdên Qereçorê ye, dayika wî ji wê komê ye û ji alî bav jî Celalî ye. Dibêje: Berê li Ermenîstanê Celelî û Qereçorî hebûn. Serokê Qereçoriyan Qaçax Nebî ye û bere serokê Qerebaxê (1813), pa§ê jî vê Nahciwanê bû. Qereçorî ji milyonekî zêdetir asîmîle bûn. Niha 10 malên Qereçorî ku dibêjin em Kurd in tu dikarî peyda bikî. Nav mane lê Qereçorî tunin. Navên gelek gund û cîhan wek Qereçorî ye...Celalî û Qereçorî misilman û sunnî ne.

Şere Romiyan û Kürden Xorasanê

Hecî Xan Sipehsalar (serokê fermadariya artûşe) leşkere Nadir Şah bû. Dîroknas dibêjin ku Hecî Xan di fena leşken û zanabûnê de serokatiya mîrovekî pir zana, netirs, mêrxas û earner bû. Peş vê çûna leşkeren Nadir Şah li Hindistan, Xarezim, Qefqesya û Iraq jî saya şere zana û xweşmere Kurd Hacı Xan de bû ku Nadir karfbû Daxistan bigire destên xwe. (192"149)

Di sala 1156 (1777) ên Irani de, şer di navbera Iran û Rom (Osmanî) de çêbû. Şere olî bû. Nadir Şah dixwest ola Şîa bike ola Islamê ya fermî; Osmaniyan jî xwe temsîldarê Xelîfê Islamê dizanîn û ev yek qebûl nedikirin. Mistefa Paşa serokê leşkeren Rome bû ku ûrîş kir ser xaka Iranê. Hecî Xan serleşker û fermandarê leşkeren Iranê çû pêçiya leşkeren Osmanî ku bi wana re şer bike. Şer di herêma Kerkûkê de dest pêkir. Wê çaxê Evdila Paşa waliyê îraqê bû. Çêrên Kurd di bin serokatiya sêrê Kurmanc Hecî Xan de şeren giran çekiribûn. Mistefa Paşa yê Osmanî êsîr ket destên leşkeren Hecî Xan û heşt hezar jî leşkeren Romî hatin kuştin û yen mayî jî reviyan. Bi tevayî arteşa Romê bi mal û jin û bi hemû çekên xwe ve ketin destên Kurmancan. Hecî Xan cîhad şand ba Şahzade Nesirelah Mîrza, ku me hemû leşkeren Romî kuştin û Mistefa Paşa jî êsîr

girt. Paşe berê xwe de bajarê Hemedan û çû ziyareta Şahzade Nasirelah. Piştî demekê kin Evdile Paşa yê Romî yê ku waliyê Bexda bû, bi Kurdên Bilbas ve hat tola Mistefa Paşa bistîne. Dema Şahzade Nesirelah û Hecî Xan ew yek bihîstin, hatin peşiya leşkeren Evdila Paşa. Li Mûsil herdû arteş rastî hev hatin, şerekî giran çebû û Romiyan vê carê jînikarîn. Kurmanc di wî şerî de 3000 bûn, eskeiên Evdila Paşa piranî hatin kuştin û yen mayî jî paşve reviyan. Hecî Xan serok leşkeren Iranê bû ku 7000 ji leşkeren Evdila Paşa yê Romî êsîr girtin. Bersiv dan Nadir Şah, çar hezar ji esîrên Romî şandin Tehran û 3000 jî şandin Tebrîzê. Nadir Şah ku di wê çaxê de li Mirad Tepê dima, berê xwe de Mihabad û çend êsîren romî jî azad kirin û bi zanyarî şandin nava leşkeren Osmanî ku xebera şikandina Romiyan bide leşkeren ku eriş kiribûn ser Urmiyê û Mihabadê. Nadir Şah ârîş kir ser çeperên Osmaniyan û ew reviyan û hinek jî êsîr ketin. Nadir Şah kon û alavên xwe ji Mihabad danîn, Şahe Rûsya ji bo pîrozkirina wî hat Mihabadê cem wî. Di sala 1158 ên Îranî de, Kurdên Zeferan li bajarên Qoçan û Teqîxan Şîrazî li herêma Şîraz û Mihemed Xan Qaçar li herêma Estirabad dest bi şoreşe kirin. Çaxê Nadir Şah ew yek zanî pir xeyidî û berê xwe de Xorasanê. Gund û bajarên li ser riva wî bi tevayî bac ji wan stend, pir zilim û zor jî li gel hate kirin. Zêr û zîv civandin serhev, birin bajarê Kelat kirin xezina dewletê.

Di destpêka sedsala nozdan de Kurmancên Qoçan li hemberî Fetîh Elî Şah Qacer dest bi şoreşû kirin û di sala 1832 an de serî hildan. Ferman- darekî Îngîlîz bi navê Bornez li Xorasan dima, avêtin ser bajarê Qoçan, leşker û qumandarê Ingîlîz bi alîkariya Ebbas Mîrza kurê Şah û cigîrê Şah bi top û topxan bajar girtin destê xwe. (,92"25)

Nişteclhbûna Kurdên Çemîşgezek / Zaferan li Xorasan

Bi fermana Şah Ebbas (1589-şoreş) û bi alîkariya Kurdên Çemîşgezek, bajarê Herat hate dagir kirin. Erdê rojhilatê Iranê jî di navbera serdar,

leşker û mezinên ji êlan hatin beş kirin. Her wisa jî welatê Sîstan (bajarê Iranê) û Kirman (wîleyeta ji nava Xorasan li Kirman) gihîşte Gêne Elî Xan serok û rêvebirên êla Zîk. Kurdên Çegene li Meşhed û aliyê başûre Xorasanê jî desthelatiya xwe hebûn.<193"153''167)

Bakûre Xorasan gihîşte Kurdên Çemîşgezek, ku tixubê wir heya Xarezim (Rûsya) dirêj dibû. Serok û rêvebirên êla Çemîşgezek (Mamoste wek êl bi nav dike, lê di esas de ne êlekê, konfederasyoneka êlan e)- ku mêrekî pir mêrxas û egît bû- bi navê Şah Elî Xan Mîr Celîlê Çemîşgezek dihat gotin ku peş de bi navê Şah Elî Siltan dihat naskirin. Peş nîşana xanî, nîşana wî ya Siltanî hebû. Di sala 1011 (+621=1632) an a koçkirinê de ku Şah Ebbas hat Xorasan wîleyata bakûrê wir bi fermî da destê Şah Elî Siltan. Şah Ebbas paş vegera xwe li Meşhed dora çemê Radikan de kon û alavên xwe hildan, ketin karê leşkerî û îdarî. Pasê bi çend wezîr û rûspiyan ve çûn Elkaîdirûn (Dirunger-navê nû Deregizê û bajerê Xorasanêye ku Kurd lê dijîn) kelaha wir çend çek û sîlah têda bûn dest danî ser û Şah Elî Siltan û ew bi nîşana xanî serbilindkir û Şah Elî Xan kire xanê Elkaidirûn/Deregez. Paşî Şah Ebbas vegeriya nava leşkere xwe, paş wê bûyerê seranser bakûrê Xorasanê ket destê Kurdên Çemîşgezek (Zeferanlo û Şadî) ku ji Gunbedkawûs (bajarê Xorasan) heya Meriw (bajarê Xorasan) û Sebizewar û bajarê kevnare Nesa (bajar bû li Xorasan) ku haya çaxê Neşredin Şah ew erd û xak di destê Kurdên Çemîşgezek de bû.

Kurdên Şadî

Paşî di biryarnama 1299 an a koçî de bi navê axai ew erd û zevî û xak Rûsa dagirkir. Kurd bi darê zorê ji wir derxistin. Rêxistina siyasî, leşkerî û gelî ya êla Çemîşgezek (Zeferan, ew êl bi wî navî tê naskirin) Zaferan êla herî

mezin ya Xorasan bû, di serdema Sefawiyan de rêxistin û rêveberiya vê êlê ji hemû êlan bi hêztir û rêkûpêktir bû ku ji 32 êlên mezin û biçûk pêk dihat. Ëla Zaferan ji ali kesekî bi navê Ilxan ve dihate birêvebirin ku berpirsê êlan a beranber hikumeta Iranê, bo parastina tixubên bakûrê rojhilat û rojhilatê Iranê bû. Çaxê karekî girîng dihat peş Ilxan, serokên her 32 êlan kom dikirin û civîn pêk dianîn û biryar werdigirtin. (l9VI',2) Wekî di beşûn derbasbûyî de jî min nivîsî; ew sîstema heta demên dawî di nava Kurdên li navenda Anadolê jî bikar dihatiye. Serdema Sefawiyan û Qaçaran de serokên êla Zeferan yen cûrbecûr wek Ilxan hebûn. Mîr Çemîşgezek, Wekîl Ekrad, Xan, Siltan û Begê- began. Şah Ebbas nîşana Mir Çemîşgezek da serokê êla Zaferan, paşê jî Wekîl Ekradxan. Çaxê Nadir Şah jî Sambeg (wekîl ekrad) nîşana begêbegan stend û bû fermandarê Xorasanê. Di serdema Qaçaran de jî, digotin Ilxan ku Emîrgone xanê Zaferan piştre ji malbata wî Riza Qolixan Samxan û Emîr Hesen Xan û serokên êla Şadî nîşana Ilxanî wergirtin. (l93/152'167) Şadî jî ne tenê êlek e.

Nivîskar îreç Efşar Sîstanî serokên Çemîşgezekan wiha rêz dike:

1. Ristem Beg
2. Oxlan Bûdak (967-1000 texmînî:1549-1582)
3. Şah Qulî Siltan, 1011 (gereg ew Şah Elî Siltan be)
4. Yûsûf Siltanî Kurd, 1037 qemerî (1619).
5. Qere Xan
6. Sam Beg (1736)
7. M. Huseyn Xanî Zaferanî, 1148 qemerî (1730)
8. Emîr Gonexan, 1198 şemsî, (1819).
9. Riza Qulî Xan, 1249 qemerî (1831).

10. Sam Xan II, 1275 qemerî (1857).

11. Emîr Huseyn Xan, waliyê Qoçanê, 1272 şemsî (1893)

12. Xan Baba Xan

13. M. Nasir Xan

14. E. Riza Xan

15. Emîr H. Xan II, di serdema Şah Riza Pehlewî de jiya. (195) Begê yekemîn Ristem divê ew ji Şah re deriyên mîrîtiya Kurdistanê vekiribe, piştre Şah ew şandibû başûre Kurdistanê.

Êla Zaferan 32 êlbegî di bin fermana xwe de hebûn. (193'153) Di cîhê êla Zaferan/Çemîşgezek de mirov bêje konfederasyona Zaferan/ Çemîşgezek hîn baştir e. Lewra ew ji 32 êl yan jî federasyonan pêk dihatiye û her êlekê ji alî begê xwe ve tê temsîl kirin. Her êlbegî yan xan serokê êla xwe bû. Çend beg jî di bin fermana êlbegî yan jî xan de hebûn. (193'153) Ew jî îşareta konfederasyon ye. Beg jî rêveberê du yan jî sê gundan bû, u malbat û berebab û pismam û xizmên beg bûn. Ela herî biçûk hezar mal bû. Hinek ji wan êlêna wek: Kîkan, Şûxkan, Qereman, Kîvan, Sofiyan û Topkan bûn ku ji 5.000 malan pêk dihatin. Gelek caran navê wan wek êl derbas dibe, lê piranî ne êlek e. Wek mînak: Kîkan, Qereman di hîn dem û rewşan de federasyon, di hîn deman

de jî konfederasyon in. Di sohbetan de gelek car an wek êl derbas bibe jî, ne raste. Hinek ji berebab (Berebav: Kuren yek mirovî. Berebab: ji çend bavan pêkdihat) bûn, wek pismam û mirov û xizmên hev ku ji 500 malan heya 300 malan bûn. Her berebab ji çend malbatan pêkdihat ku malxweyê rnalê birêve dibir û bac ji wan dihat s tend in, wek Samanpolî, Çopanpolî, Şaxpolî, Gilînpolî û Tutunçîxerpolî (Pol; perê Iranê-diraw jê re dibêjin.). Ez (nivîskar) êla Kîkan qenc nasdikim û diciiin ber çavên xwendevanan.

Di konfederasyona Zaferan de federasyona herî mezin Kîkan bû, di dema Emir Hesen Xan de ji sê êlan pêkdihat:

a. Sêvkan

b. Bîçeran

c. Kîkan.1193"153)

Berê jî min got, li rojavayê Kurdistanê û li navenda Anadolê, Sêvkan êleka girêdayî Reşiyan xuyadike. Li bakûrê Kurdistanê Kîkan wek komeka ji Sêvkan cûda xuya dike; heta me gotibû têkiliya wan Canbegan jî heye. Em baş nizanin ku li Xorasanê ew bi hev re îttîfaq kirine an heman êl in... Lê di axaftinên Sêvikiyên li Xorasanê guhdar dikî, tê texmîn kirin ku ew bi Canbegan ve tevhev mane. Ew jî dîtina Kîkî Canbeg in û li Xorasanê bi Sêvikan re ketine nava federasyonekê piştrast dike. Tewahûddî dibêje: Serokê êla Sêvkan Sadet Teqî Xan Qobadî êlbegî bi jêhrê kuştin, birayê wî Qadîr Qolixan Qobadî li cîhê wî rûnişt. Ela Sêvkan di gundê Oxaz de rûdinên. Digotin ku gund bi destên Mihemed Beg hatibû avakirin û malbata wan li wir diman. Êla Sêvka begên xwe hebûn:

Komkîlan: Li günden; Kelata Sefa, Xakistes Kelat, Qoç Kelat, Xwedîkan (bi Xûkan navûdeng in) rudinin û Bacgî ku jî êla Sêvkan bû ji hemû berbaban bêtir bû qasî 500 mal bûn.

Şokran: Gundê Şokran ji bajarê Mû§ê hatine wir û di gundê Ozdek de rûdinên.

Olaş: Ji gundê Olaşe ji Kurdistana bakûr hatine Xorasanê.

Bovan: Ji gundê Bovan û Qerçixê

Sefkan: Ji gundê Sefkanli yê kavil buyî gundiyan barkirine çûne Oxaz û cîhên din.

Hemzekan: Ji gundê Hemzekan.

Zortan: Ji gundê Zortan.

Bîware: Ji gundê Bîware ku hinek ji wana xwe Sêvkî û hinek jî xwe Bîçerî dizanin.

Xuraskan: Ji gundê Xersekan ji Kurdistana başûr û cîhe Ingîlîz Iraq dagirkirî hatine.

Zaxoran: Gundekî kavil (Zaxoran-Zakoran) bûye.

Şerkan: Ji gundê Şerkan navça Bîçeran, mirovên gundên Oxaza kevnar (Kohna Oxaz), Dorbadam, Imanqolî, Şarek, Kelata Vêlo, Qizilqan, Ça rbûrc, Bîr Zeynel Beg, Qeleta Çox Tirik û Xetab ew malbat û berebab hemû Sêvkan in.

Wek em dizanin koma Sêvkan ji 12 êl û çend berebaban pêk hatiye ku pira- niya wan di gundan de cîh girtiye û hinek jî koçer in.

ZEFERAN (-LO)

ÇEMÎŞGEZEK

Kurdên Xorasan, ku îro bi Zaferan tên naskirin di bajarên: Esferayîn, Neyşabûr, Şirvan, Qoçan, Deregez, Kelat, Çinaran û Meşhedû de cîh girtine. Di serdema Selçûqiyan de ew êl di Kurdistan de diman ku îro jêra dibejin Tirkiyê û Iraq nave wê êlê Çemîşgezek bû. Iro jî pîremêr û pîrejin xwe bi wî navî nêzîk- tir dibinin û dibêjin em ji êla Çemişgezek in. (m"lfc} Çemîşgezek rastı re, lewra ew ji navenda Çemîşgezeke hatine û di dema Osmaniyan de ew herêm bi navê Kurdistanê dihate zanîn. Ji bo mîrîtiya wir zû bi zû têk nediçû û Kurdên wir gelek şervan û bi rêxistin bûn. Di beşa Osmaniyan de me qala vê kiribû. Navê Zaferan gereg di dure girtibin. Lewra ew navekî tirkî ye û ji serkeftina şer tê. Yan jî ewên têk naçin û hertim bi serkeftin ji şer derdikevin e... Lia (Hûn wek konfederasyon fêhm bikin-ş) Zaferan û berbavên vê êlê bidin ber çavên xwen- davanan:

Izan:

Ew êl bi gotina nivîskarê coğrafya Iranê Mesûd Kêyhan, 1200 mal bûn û di bajarên Xwar-Weramîn û di gundên bajarê Şîrvane mîna: Badam, Qizilhîsar, Şorik, Kelat û Evdevê û gundê Kelatê Sora de jiyana xwe berdewam dikin. Gor çavdêriya min ew êla hanê, nêzîkî Reşiyan e, di axaftin û qerekterên wan re ew xuya dibe. Wekî berê ji min nivîsî ew di sedsala XVI an de li Semsûrê êleka girêdayî Reşiya bû

Baçiyan:

(Baç+î+y+a+n) Baçiyanbi kurdîye. Baçiyan(lo)bi tirkîye. Peyvekapaşnav yan li ser êl, malbat, bajar û gund kıı xwedîtiyê dide xuya kirin bi kurdî, bi tirkî lo ye. Ji ber vê yeke her paşnaven kurdî ku xweditiyê li ser tiştekî tê nivîsandin, gotin bi du cûreyî hatine gotin û nivîsandin; carekê bi kurdî carekê jî bi tirkî. Lê Baçiyan navê rast û durist yê vê êla hêja û rind a Kurdan e. Gelo em bejin ew êl bi navê bac bû yanî bac/xerac dane kesekî yan jî kesekî stendine. Yan em bêjin "baş" bû ku bi tirkî ye û bi kurdî dibe ser carna gotine wana başkanli yanî mirovên ser bi xwîn. Ev yek cihê lêkolînê ye. Li ser şirovekirina mamoste, mirov dikare vê zêde bike: Başkanli ku tirkî ye û dikare bibe kesên ser bi xwîn yan jî kesên bi serok. Dikare di herdû wateyan de jî bê şirove kirin. Ew navekî tirkî ye ku wekî hemû êlên din ên Kurd di dema Osmaniyan de navên tirkî li êlên Kurd kirine. Nasiredin Şah çaxê çû Xorasanê gote wana Başqanlo û got ew êl hinek ji êla mezin ya Şikak ku di Azarbeycana rojava de dijîn û hatine wir. Hinek rewçenbîr jî dibêjin Bacvanlo, Bacvanlo û Başkanlo. Piraniya wana di gundên Doletxan û dorûberên wî gundî de dijîn. Rehma xwedê li ser be, Mihemed Elî Sehrayî pêhlêwanê (bersînganê) ku nimûne bû di Iranê de, ji êla Baçiyan bû û li gundê Doletxan hate dinê. Sehrayî malbetek û berebavek ji êla Baçiyan e û 400 mal in û li bajanê Esferayîn û di gundê Babaçeşnw de cîh girtine û jiyana xwe didomînin. 50 mal jî li bajarê

Bicnûrd û li gundê Aşxanâ dijîn û yê herî bi nav û deng Ebbas Elî Qoçanî. Yên din li bajarê Esferayîn û di gundên Qaracah, Mengelî, Nisiretabad, Hesarî, Dehenî Şûr, Dehene Şîrîn û Doletçah de dijîn. Karê wan pez xwedîkirin û cotkarî ye. Zivistanan diçin Meravê Tepe û havînan jî di zozanên çiyayê Şahcîhan/Şaycane de dimînin. Hinek jî êla Baçiyan di Kurdistanê cîhe nû Iraq dibejin de dijîn. Nivîskarê heja Mardûx Kurdistanî nivîsandiye ku Başmanli di navbera Melazgir û Eleşgirt de ji wir hatine Xorasan. Pismamê min gelek caran girêdana van êlan bi başûne Kurdistanê re dike, lê ez rastî giredaneka dem-dereng nehatim û piraniya van êlana jî ji rojava û ji bakûrê bakûr-Kurdistanê çûne. Di karaseta sala 1323 an de ku Ozbekan avête ser kon û malên êla Baçiyan, bû sedema kuştina hinek mêrên êlê û keç û jin jî êsîr kirin û birin bazara firotinê. Ew yek gelek deng veda û bû egera şoreşa meşrûtiyet li Iranê û damezrandina dadgeha fermî bo cara yekê di Iranê de.

Badilî:

Di salan çûyî de navên xwe kirin Bihadran-lo yek ji berebavên herî mezin ya êla Zaferan e. Mamoste Mardûx dibêje li Badilî qasî 1.000 mal li Eleşgîrt û Yûzxadand û 700 mal jî li Zara dijîn û hemû jî lı ser ola Şîa ne. Serokên Badilî di serdema Nadîr Şah de pir bi hêz û navûdeng bûn. Nasireddîn Şah dibêje di cîhê wana wîleyeta Xorasan û di tîxubê bajarê Qoçan û Çinaran de dimînin û dijîn. Di navbera Bîzgî û Çeşmegîlar jî cîh girtine ku berebava Badilî û Hemzekan li wir jî dijîn. Malbat û berebava Badilî mêren bi nav û deng û

bi heybet in, gelekî mêrxas in. Badilî dİ bajarên Deregez, Kelat, Qoçan, Kelata Gol, Elaqecinban, Mergzer û dor û berên Qendab jî cîh girtine û jiyana xvve didomînin. Nasreddîn Şah dibêje: dema min ew dîtin, ew tiştana hatin bîra min: Mirovên bi mirûz, gir, bi hêz, aram û zanayî ji wan xuyadikir. Xwedê lê xweş bûyî Tac Mihemed Xan bi hadirî nav deng bi

navê Sitûtêl Melik ji malbata Badilî bû. Serokê êla Çemîşgezek ew yek jî wan xana bû ku di ceng de alîkarê Kolonêl Mihemed Teqî Xanê Pisiyan bû. Me berê qala Pisiyan kiribû û li wir têkiliya Pisiyan-Berazî û Badiliyan derdikeve ku mirov dixwaze bipirse gelo ew yek kom e?

Birîvan/Birîman/Birîkan:

Birîvan, li bajarê Meşhed û Kelat û di gundê der dora wan bajaran de dijîn. Hinek jî li tixubê Kelat û Serezis de koçerên pêz in û 15 kerî pezên wan hene. Ew ji Kurdistana Iraqê hatine. (192> Min ew ziyaret kiribû n, li rojhilatê başûre çiyayê Hezarmecîd dijîn û dibêjin em 1500 mal in û topeiê-berê me ev in: Mella, Goseran, Mezlûman, Pelûlan, Endêrîsan, Şertûsan (ji bajarê kevnare yê Kurdan Tûs), Qarxê xûran, Hedeşeniyan, Hecîxaniyan (Hişmetî), Xevriyan, Maqan, Ekremiyan, Insafiyan in. Mirown xwîngerm, esmer û kin in. Ti işaret nînin ku ew ji başûre Kurdistanê hatine. Ew tespîtên bi vî rengî ne rast in, piraniya wan ji bakûrê Kurdistanê û ji rojavayê (Dêrsîm-Dîlok) Kurdistanê hatine.

■

Komeka ji Birîvan

Bîçeranî (Şamlû, Sêvkan):

Berebava Bîçeran yek ji malbaten pir bi nav û deng yen Xorasanê mêrên netirs, mêrxas, xweşmer û egîd in. Wana tixubê Xorasanê ji deste Ozbek û Tirkmenan rizgar kirin. Bîçeran, Sêvikan û Kîkan heya taliyên Hİkumeta Emir Hesen Xan Şicaidûle yek berebav û malbat bû ku bi navê Kîkan dihat naskirin. Nasiredîn Şah gotiye, ku ew berebab jî hemû berebav û malbatên êla Zaferan girîngtirîn û mêrxastirîn heya roja îro bavvername (senedû secerename) ku di çaxe wana dihatine xuyakirin. Iro jî di desten

min de ne, dibejin; ku Bîçeran, Siverkan (Sivkan-Sîfkan) bi navê Kîkan in û serokatiya wana jî di destê emîrên Sêvikan de bûye. Emir Hesen Xan Şûcaidûle di sala 1310 (1891) an de êla Kîkan kire du beş. Yek bi navê Bîçeran, yek jî bi navê Sêvkan. Kîkan (Keykî) jî ku li bakûrê rojava û bakûre Qoçan dijîn, jihev veqetiyane û cûda bûne. Serokê êla Bîçeran, Elî Xan Beg Bîçeran di temenê 95 salî di zivistana sala 1362 an de çû ber dilovaniya xwedê û mir. Bîçerî di bajarê Şîrvan û gundên: Qelê Hesen, Qelebeg, Tûranli, Kelata Balî, Qelê Nexdû, Qeleta Dol, Gedogan, Qolan, Berder, Hename Zîndan, Qalîtman, Korkan, Duab, Buriczolifqar, Xelac, Locêlî, Bîk, Qereçîşme, Postîndûz û Memedoran de cîh girtine û dijîn. Hindikên wan jî koçer in. Elxas jî berebavek ji Bîçeranê ku di Kurdistanê de, îro jê re dibêjin Sûriyê ne û îro jî di gundên tixub yen Xiristiyan de jiyana xwe didomînin. (193)

Jineke Bîçeranî - li milê rastê

Elxas pir anî li dora Mereşe û heta Sêwasê jîbela v dibin; nêzîkbûna wa n bi Sêvikan re xuya dibe, lê mixabin beşek ji wan heliyane. Bîçeran min di pirtûka yekemin de pir nivîsandiye ku ji aliye Şam hatine wir. Ew bi navê Şamalı û Şamlo (Şamî) jî tên naskirin. Serok û emîrên Bîçeran di bargeh û hikumeta Sefawiyan de xwediyê karen pir mezin bûn û gelek jî bi hêz û hürmet bûn. Her wisa çaxê Şah Ebbasê IJ wezîre agah û revvşenbîre xwe Mîrza Mohemmed Teqî Itimadolê bi navbangê Sarotteqî bi alîkarî û xiyaneta karbidestên bargehê bi rewseka hovane dikuje, mal û pergalê vvî zevt dike. Ana Xanim dayika Şah Ebbas ji bo tolhildana wî, wezîrê nû ji emîrên Bîçeran ku xwedî hêdbar û hêz e hildibijêre. Ku ew yek jî netirsî û mêrxasiya Bîçeran derdixîne holê (Kuştina Sarotteqî di sala 1055 (1635)de, di heyva Şabane ango heyva piştî Remezanè de bûye). Hecî

Silêman yek ji rûspî û xwedî hêz yen Dergezê bû û dİ dema ciwaniya Nadir Şah de dijî. Dema ku Nadir Şah li her aliyan bû hedefa kîn û kerba dijminên bi hêz, rabû alikariya Nadir kir û Nadir Şah ku birîndar bûbû di mala xwe de xwedî kir û yek ji hekîmên herîbinavûdeng ji bo dermankirina birîna Nadir ya kûr anî Ebîwerdê (Yek ji bajarên girîng yê Xorasanê bû ku li gor biryara Axalê di dema Nasireddîn Şah de dane Rûsan).

Birêz Ebolfezl Qasimî di pirtûka xwe ya hêja de dibêje/'Pirsgirêka Na¬dir Qolî (Nadir Sahê paşîn) bûbû pirsgirêka rojê di Ebîwerdê de, xaniyê wî ku niha bûbû mala Hec Silêmanê bazerganê Bîçeran bûbû navenda hêvî û dax- wazan û bûbû qîbleya gelê rene dîtî û dîl mayî di desten bê rehm û yên dagîr- kerên biyanî de bi awayeke dizî hevûdin. Ji halê silametiya wî agahdar dikirin û diçûne serlêdana wî. "Diyare ku kesek dikare dijminê hakimê Ebîwerdê di mala xwe de derman ket ku dilê Sêhrî hebû û ew yekê jî taybetî Hac Silêmanê Bîçeran bûye. Ku paş başbûna Nadir, wî bi rê dike bo destgirdî û ji hevalê xwe Mîrza Nûrollahê Kurd ê Şexan ku li destgirdî dijî daxwaz dike ku her gave li Nadir xwedî derkeve û canê vvî biparêze. Her ew Mirza Nûrollah Xanê Şexan yê ku bûye baîsê pûşkevtina Nadir û ji ber piştvanî kirina ji Nadir re, di bin îşkenca giran ya hakimê destgirdê de tê kuştin. Hatem Begê Bîçeran (ji ejdadên Qobadiyan) Hac Xan Begê Hemzekan (serdarê ku Dêhlî xiste destê xwe) û îlyas Begê Mamiyan û Xosroxanê Qereman çend kes ji mezinên Kurd in, ku piştgiriya Nadir kirin. Hec Silêmanê Bîçeran jî §evekê bi destê neyarên Nadir ve hate kuştin.

Palûkanî:

Ji êlên Kurmancên Zeferan yên Xorasanê ne, ji eslê xwe ve ji "Palo" ya ku deverek ji Kurdistana bin destê Tirkiyê de ye hatine û Şeref Xanê Bedlîsî di Şerefname de wan ji Kurdên Rojkî binav dike. Palûkaniyên Xorasanê ku

di mêrxasî û netirsiya xwe de bi navûdeng in, di bajarê Deregezê li herêma sînora Bacgiran dijîn. Cîh û warê wan yê eslî li qiraxa rastê ya Çemê Eiratê ye, ku 95 km ji Amedê dûr e. Xwedê lê xweş bûyî Merdûx dibêje ku: "Balekan ji gundê Balekan li Kurdistana bindestê Iraqê ne. Ela Balekan 1200 malbat in, ku Serayî

çemê Rewandûzê li Hewlêrê dijîn ku zêdeyî 60 gund di destê wan de hene û nêzîkî 300 malbat jî ji êla Zerza têne zanîn. Du gundên Palûkanî ya jorîn û jêrîn ketine herêma Bacgiran li gundên ser tixub, Cîristanê herwisa du gundên Palûkanî ya jorîn û jêrîn li bajarê Deregez yen Kurdên Palokan in. Bi dîtina min Palûkan bi Balekan ve jihev cûda ne. Beşekî Palûkanîrojî li dora bajarê Agiriyê hene ku ji yên Xorasanê veqetiyane. Palûkaniyên li Xorasanê min ziyaret kirin, hevalên min en hêja ji wan hene û qerektera wan mina Sêvika û Reşiyan e. Îhtîmaleka pir mezine ku ew bi hev re girêdayî bûn.

Gundê Palûkan

Pehlewanî:

Bi navê "Pelûlan" jî bi navûdeng in ku di dema derbasbûyî de li herêma navbera Imamqolî û Dûrbadam û Bajgiran û Oxazê dijîn. Karê wan pez xwedîkirin bû. Zozanên wan her ew herêma bû, di dema zivistanê de bardikirine aliyê Eşqabad û bajarê Nîsa. Ela Pehlevanî di sala 1226 ên qemerî de, anku di 1846 zayînê de, zozan û çiyayên ku bindestê wran de bûn firotine Mohammedî Begê Kîkan û hatine Oxazê. Dibe ku ji wê herêmê koç kiribin niha jî li bajarên Qoçan, Meşhed, Bocnûrd û Şîrvane belav bûne. Nivîskarê pirtûka Metleûşşems ku di sala 1300 ên qemerî de dema ku Deryam Nasireddin Şah bi rêya Bocnûrdê diçû Şîrvanê ser rêya xwe li qeleya Mûsaxanî nêzîkê Gîliyan, rastî Kurdên ji êla Pehlewan hat û

herwisa nivîskar dibêje ku Kurdên Pehlevanî ku ji êla Zeferan in, li wêderê dijîn û nêzîkê 50 malbatan in. "Di pirtûkên Osmanî yên kevn de navê vê êlê wek Pehlivanli derbas dibe û hinek ji wan li Anatoliya Navîn in, lê mixabin min navê wan ên kurdî nikarî derxim holê.

Di beşa Pezgewran de min nivîsîbû, ku gor hinek jêderan bave vê komê yê sêyemîn navê xwe Pehlewan Beg e. Gor Ebû B. Tehranî jî bavê Pezgewran yê VI an Idrîs di destpêka sedsala XIII an de hinek keleh û herêmên li Amedê birêve dibirine. Torinê Idrîs, Pehlewan Beg jî serleşkere kela Alicaka li Nahçiwanê ye. Pehlewan, bi zora waliyê Moxol Cûrmagûn di sala 1330 an de çû rojavayê Anadolê(114‘70)û min gotibû mumkune ew kalên Têrikiyên îro ne.

Topkanî:

Pismamê min Tewahoddî dibêje; Bi navê "Topan" jî tên nasandin. Top di Kurmancî de tê wata komek ji kesan an jî komek ji daran. Ew yek jî tê wê watê ku Topan ji çend êl û beran pêk ha tine.

Bi dîtina min navê vê êl yan jî federasyonê di bingeh de ne Topan e, ew navekî tirkî ye û kesên ku topên şer lê dikirî re digotine. Wekî berê jî min gotî, ewên di şer de tîr çêdikirî re gotine Oxçû, yen baca xwe bi hespan didanî re hotine Hespîkeşan û hwd. Navê vê êlê jî ji karekî wiha tê, yanê di artûşa Osma- niyan de wan ya top dikişandin yan jî top lêdikirin û Tirkan ew navê lê kirin. Ji bo ku ew koma ji axa Osmaniyan çû Xorasan ew nava li ser ma. Navê kurdî bi texmîna min Avşar e...

Niha jî yek ji êlên herî mezin û belavbûyî yen Kurmancên Xorasanê ne ku li Coweyn, Isfarayn, Sebzîvar, Şîrvan, Qoçan, Deregez, Meşhed, Bakûrê Nêyşabûrê û rêze çiyayên Bînalûkê dijîn. Hinek ji wan cîhgir bûne û gelek ji wan jî hîn koçber in. Min ewên koçber ziyaret kiribûn û di konê wan de, di sala 2001 an de sevekê raketibûm. Mirovên pir cîddî, bi mirûz û

nîvanperwer in. Di dema nû de gelek ji wan jî Meşhede li taxa Ab û Berqê nîştecîh bûne û li herêmên rojhilat û rojava diçine zozanan. Helbet Ivanof qala herêma sisêyan jî dike ku ew jî qiraxa berûyê ye û dibêje "Topkan li herêma Cowîn û hinek ji Nîşabûre û di zivistanê de jî bi der û berê deşta Teqî koç dikin. "Herêma roj¬hilat komên ji hev belavbûyî li deverên Nîşabûr, Exlûmed, Bînalûd, Klîder û Mohammed Begî hereket dikin û li qiraxa çemê Ke§frûdê û bervê Serexsê ve diçin. Di meha Kanûn û Çile de li qiraxa çemê Keşfrûde ne û li qiraxa rêva Serexs-Meçhed, 90 km mayî be Mozdûran têne jêrê. Hinek ji wan zivistanan, 60 km ji Me§hedê dur, li dor û berê Miyamî yê derbas dikin. Yên din jî di dest¬pêka meha Çile de hereket dikin û ji Geviya Mozdûranê derbas dibin û di dewsa boriya gazê de ber bi Çeko ve diçine p6ş ku zozanên xwe yê zivistanê berhevkin û pezên wan jî li wêderê dizê. Ava xwe jî kaniya Mozdûran ku gelek ji cihê wan dûre dibin. Li gel hemû zehmetiyan ku di anîna avê de dikişinin jî, gelek paqij in û herdem kinc û bedena xwe dişon.

Beşek ji wan jî diçin aliyê Aqderbenda Serexsê li gel hatina biharê di dewsa xwe ya hatine de paşve dizivirin û li rêze çiyayê Binalûdê heya Nîşabûre belav dibin. Pişka zor ya berhema pezên xwe li Meşhed û Nîşabûre difiroşin.

Li herêma rojava jî komên Topan yên ku ji deverên Qoçan, Şîrvan û Esferayinê hatine diminin. Ew kom havînê li rêzeçiyayên Şaycan û çiyayên nêzîkê Oxazê ne û di destpêka Tirmehê de ji çiyayan ber bi xwarê ve tên û pezên xwe di nav zeviyên ceh û genimên ku hatine dirûn de diçêrînin û hêdî hêdî li qiraxa çemê Etrekê, berbi rojava ve diçine peş. Di destpêka heyva Ilonê de li deverên Şîrvan û Bocnûrdê ne û paşve jî diçin herêma Meravvê Tepê. Eger di demsala payizê de baran baş bibare û çêre bo pezên wan hebe, di meha Cotmehê de dikevine herêma fireh ya Merawê Tepê û li ber çemê Etrek belav dibin. Piraniya Topkanî yên ku li herêma

rojava dijîn bê mêrg û zevî ne. Ji ber vê yekê jî her sal perekî zêde ji bo çêrandina pezên xwe li nav mergan de, di- dine xwediyê mêrg û zeviyan.

Topkaniyên koçber

Beşekî Topan jî li bakûrê Kurdistanê, bi qasî min (Ş.R) lêkolîn kirî li alî Dîlok, Mereş û navçên wê mîna Goksû, Elbistan, Pazarcik û Besnî-Semsûrê Topkira-Tofgîrayê hene. Topkirayê li vê herêmê, bi Topkaniyên li Xorasanê ve yek êl yan jî federasyon e. Hinek ji wan xwe wek Atma, hinek wek Canbega, hinek xwe wek Sinê Milî û hinek jî xwe wek Topkira nişan didin. Dibe ku ji konfederasyonekî belav bûbin. Kerekterên wan pir hişk in û zû şer dikin; Elevvî ne.

Jin û mêrên Topkaniyan nav mil pan, çavreş û mêvan perwer in û ew yeka jî ji ber xêra xwezayê ye. Jinên Topkan di lixwekirina kincên bedew de li nav Kurdên Xorasanê gelek bi nav û deng in. Komên Topkaniyan ku min kariye berhev bikim wiha ne:

1. Korkanî/Kerkanî: Ne diyare ku girêdanek êla Kêrika bi Kurdên Lib-nanê û êla Kêrik ya vvêderê heve an na. Kêrik li herêma Cebel Amilê ku gelek rewçenbîr û kesayetiyên navdar ji wêderê der ketine.

2. Kalmişî: Ev koma li deverên Klîdar û Sebzewarê ne/ ku li pirtûka bêja Dewlet Abadı li ser navê Klîder qala wan hatiye kirin.

3. Ferhadxanî/Beyan: Ku koka vê komê digihêje Ferhat Xanê Topkan ku li gel Welî Xanê Qeremanî di sala 1305 an (1926) de dixwestin Riza Şah li Qoçanê bikujin û li gor xwe rêya dîrokê biguhurînin. Koma Ferhadiyan bi navê Beyan jî tên naskirin û nêzîkê 1000 malbat in ku li du gundên 350 û 650 malî nêzîkê birek baş tax dijîn û nêzîkê 25 kerî pezên wan hene. Ferhadxan di dema Riza Şah de zikata di nav Topkaniyan de bi xwe dicivand û nedida dewletê.

4. Letîfî: Nêzîkê 200 malbat in û 10 kerî pezên wan hene.
5. Torabi: Nêzîkê 400 malbat in ku 11 kerî pezên wan hene.
6. Şîr Qazî: 300 malbat in ku 6 kerî pezên wan hene .
7. Aqa Mohemmed Xanî: 500 malbat in û 15 kerî pezên wan hene.
8. Simkan: 300 malbat in û 10 kerî pezênn wan hene.
9. Zeynelî: 300 malbat in Û10 kerî pezên wan hene.

Êla Topkaniyan li hemû deverên Xorosanê belav bûne ku zêdeyî 7000 malbat in û zêdeyî 145 kerî pezên wan hene. Hinek ji Topkaniyan zivistanê ber bi Meravê Tepê ve diçin û havînan têne çiyayê Şaycan û Aladaxê. Yên din jî zivistanê diçine Serexsê û havînan jî li dor û berên Abrevan û Keçîbar û Gavmîşîne dibohirînin. Min ewên li Şaycan6 ziyaret kiribûn, ku mirovên bi hestên netewî tijî ne û di derbarê dîroka xwe de gelek detayan dizanin.

Celalî:

Navê Celalî li her cîhê ku Kurd lê dijîn mirov dikare peyda bike; ew ne tenê êlek e, bi sedan êl di bin vî navî de hene û Osmaniyan ji êlên dijber û ser- hildêr hemûyan re gotine Celalî. Li ser Celaliyên herêmên din em rawestiyan û emê di beşen din de jî rawestin; li ser yên li Xorasanê mamoste wiha dibêje: Yek ji êlên herî bi nav û deng, girîng û şoreşger yên Kurdan êla Celaliyan e; kupişka herî mezin ji wan ber bi Xorosanê ve birin û ji ber netirsî û şervaniya wan li tixubê Iran û Xarezm li bakûrê Şîrvane hatine bicîh kirin. Li ser Kurdên Celalî yên wê herêma hessas û pirxeter, divê pirtûkek din bê nivîsîn. Ku li dema wan 400 salên bihurî de çi hatiye serê wan û çawa jiyane, di wê demê de çand, ziman û edetên xwe bi taybet li nav Sovyetê de bi rengek herî xurt zindî hîştin û lê xwedî derketin yek ji wan karên ku tê meraq kirin e.

Zêdeyî ji sedî notê Kurdên Celali îro di axa Sovyeta berê de dijîn û yek ji navendên girîng yên kombûna wan bajarên Aşkabad û bi taybet Fîrozê (tê gotin ku li vî bajarî 100 hezar Kurd hene-Ş.R) ye. Rûsan di salên 1299 an de (1879) û 1311 (1891) ji Irane veqetandin û pêwîste mirov li ser mêrxasiya Cela¬liyan û bûyerên ser tixubê Fîrozê cûda qal bike. Her wekî Celalî dibêjin û dîrok

ji qal dikin, ew ji bakûrê welatê Sûriyê (Şam) ji herêma Heleb, berbi Amed û Çemîşgezeke koç dikin, lê ji ber ku nedişiyan jêr zextûzor û zilına Osmani- yan bijîn, neçar man berbi Iranê ve koç bikin. (193"152/l67) Bê zanîn başe, ku dema Celaliyan serî h il dan, wê demê bi tevahî li Anadolê û rojavayê Kurdistanê bûn. Mamoste dibêje: Di dema Şah Ebbas de ketin nav îranê; lê ew tam ne di cîh de ye, eğer mirov ji bo beşekî bibêje ew raste, lê berî wê demê jî gelek Kurd û di nava wan de kalên Celaliyan jî çûn Iranê. Şah Ebbas, wezîrê xwe yê mezin Ha- tem Xanê Ûrdûbadî Itimadoddole berbi wan şand, mezin û rûspiyên Celaliyan vexwende Isfehanê. Paşe jî destûra wan da ku bizivirine welatê Mukriyan û bi rêberî û hevkariya Emirxanê Biradostê Lepzerîn êrî§ê bibine ser wî parçê Kurdistanê ku di bin dagirkeriya Osmaniyan de ye. Her wisa destur da ku her êla Kurd ya desthilatiya Iranê nepejirîne divê ji holê bêne rakirin. Lê ji ber ku nakokiyên olî û mezhebî di navbera Iran û Osmaniyan de gihîştibû radeya herî bilind û her yek ji wan yê din bi kafir û bê dîn bûnê tawanbar dikir ji ber ku Kurdên di bin desthilatdariya Osmaniyan de bûn girêdayî mezheba sunî bûn û ji hikumeta Şîa ya Sefawiyan heznedikirin û nediçûn bin barê hikumeta Sefawiyan. Eger Emirxan guhên xwe bida Şah Ebbas û di gel Kurdên Celali li dijî Kurdên rojhilatê Osmaniyan şer kiriba, bê guman ê zêdetir xwîn hatiba rijandin û piraniya êl û tayifên Kurdan li rojhilata Rome wê bihatana kuştin. Emirxan ku mirovekî pir zana û jêhatîbû tegihîşt ku Şah Ebbas dixwaze ku Kurdan bi destê Kurdan bide

qirkirin. Ji ber wê yekê jî li gel Celalî û hêzên Şah hevkarî nekir û di Kela Dimdim de serhildana xwe li dijî Şah Ebbas ragihand. Nûserê pirtûka Arayê Ebbasî li barê nasandina Celaliyan de dibêje ew kesên ku li dijî împaratoriya Tirkên Osmanî serhildidan re digotin Celalî. Eşkereye ku ji bilî Kurdan ti miletekê newêre li dijî Osmaniyan xebat bikin.

Nivîskarê pirtûka "Alemê Ara" dibêje: Ji Bûrsa heya Erzirûmê ew wîlayetên ku Anatoliyê ketibûn bin simê hespên Celaliyan û Siltan Ehmed Xanê Xwandegar û karbidestên dewleta Osmaniyan derxistina dijminê nav malê de yek ji karên serekî yê xwe dizanin û di fikra paşvedana Celaliyan de bûn. Ji ber wrê jî Mûrad Paşa ku mirovekî zana û xwedî hêz bû, kiribûne wezirê mezin û serleşker şandibûn şere dijî Ewrûpiyan, di wê demê de xeber dane Mûrad Paşa ku Celaliyan kareke wisa kiriye. Le wma jî ew mecbûr ma li gel Ewrûpiyan aştiye bike û hêzê xwe ji Rûmelî, Kapikûle, Anatolî, Menteş, Qereman û Trablos û ji cîhên din yên memleketê Osmaniyan kom bike û li dijî Celaliyan şer bike.

Hemzikanî:

Nûser bawer dike ku ew êl ji Hazoyê ne. Hazo, herêmêke li Kurdistana Tirkiyê û Kurdên Hezo li wêderê binav û deng in. Dibe ku Hezoyan eslê w'an be ku pasê dibe Hemzoyan û Hemzekanî. Hemzekan ku Hecî Xanî Hemzekan ewê ku Dehlî girtî û yek ji serdarê Nadir Şah e. Ew li Bocnûrd, Qoçan û devera Golmekan nêzîkê Meşhedû belavbûne ku gelek ji hev dûr in. Nasireddîn Şah,

malbat in ku koçber in û li başûre Erzirûmê li Kurdistana Tirkiyê dene. îvanof dibêje: Reşî li Xakister, Layîn û nêzîkê Kaxekê di bin konan de dijîn. Mardox dibêje: Reşî 70 malbat in, li başûre Erzorûmê koçber û gerok in. Reşî 500 malbat in li devera Qazwînê. Reçewend çend malbat in li herêma

Ezerbeycanê wekî îvanof dibêje, li herêmên Kelat û Xakister û malbatên Reşî here, nabe ku ewe paş ve zivirîbine Quşxane û dibe ku Kürden wê herêmê hinek jê Reşî bin. Mirovên ji gundên Emrûdek û Tolfûr û Dermiyan ji beşa Çinaran jî Reşî ne. Lİ Quşxane Reşî li wan gundana dijîn: Qopoz, Kakilî, Bax, Emîrxan, Qolika Jêrin û Jorîn, Gundê Dehxan, Cenga, Helva, Çişme, Kela Mihemmed Elî, Hisar (zav), Pîran, Sincek (Sinceq), Çûrçûrî, îzman, Teftazan, Yêngî Qelê. Wekî me di beşa Reşiyan de jî gotibû serhejmara wan nayê hesap kirin, gelek in û li gelek cîhên Kurdistanê, Anadolê, Sûriyê, Xorasanê û herêmên din hene. Bi rastî, ew serhejmara hatine dayîn yen lokaline ne; bi giştî hesap kirina serhejmara Reşiyan karêkî pir bi zahmet e.

Rûtika:

Bi navê Rûtan jî bi nav û deng in ku ji peyva rût tê. Yek ji mêrxastirîn û di heman demê de yek ji bedbextirin Kurdên Xorasanê ne di aliyê jiyanê de. Hinek ji wan di konan de dijîn ku navbeyna Qoçan û Meravê Tepê her tim tên û diçin û havînan jî li çiyayên Oxazê ne. Hinek li Sîrvanê dijîn. Rût tê manaya tazî û Rûtan jî yen tazî. Dema ku mirov li jiyana wan ya li konan dinêre, jiyana mirovên di dema Esrê Hecer an ku perîna Sengî yê tê ber çavê mirov. Ku ew jî li ser mirov pir bi bandore û mirov pê dieşe. Merdûx pê îşaret dike dibe ku ew ji tayifa Cafan bin. (Merdûx Cild 1 rûpel. 77)

Rûta Kurmanc in û ti têkiliya wan bi Cafan re nine. Rûta bi piranî bi Şadivan re û li hinek deran jî bi Milan re tên giiêdan. Li Anatoliya Navîn û girêdayî bajarokê Polatliyê jî gundên Rûta hene. Li bakûrê Kurdistanê gelek Rûtayî hene ku li herêmên cûda dijîn.

Zeydanî:

Bedlîsî di Şerefname de Zeydaniyan ji êleka mezin ya Rojka dizane û cihê mayina wan jî herêma Colemêrg yê li Kurdistana Tirkiyê dinivîsîne û

dibêje: "Ela Rojkiya di nav êl û tayifên Kurdistanê de bi mêrxasî, mêranî, xîret, binamûs, rastî, dîndarî û xerxwazî de bi nav û deng in. Di nav Kurdan de dibêjin ku berdêla her kevirê ku di dîwarê kelê de mirovekî Rojkiyan hatiye kuştin û ew tayifa bûye 24 beş ku ji wan pêne beşen Qêysanî, Bayikî, Mulikî, Zoqêysî û Zeydanî êlên kevin vên wilayeta Bedîîse ne.

Li Xorasanê li gundên Zeydaniyan tê gotin, ku 2000 heştiren Zeydikan tişt û barên Qoçanê tanîne Bajgiran û ji vir jî dibirin Eşqabad a Rûsya yê.

Reîsê Kurdên Zeydanî yen li Deregezê bi navê Ismaîl Kurt dihat naskirin ku paş wî jî kurên wî bûn serokên êlê. Gundê Zeydanî yê Qoçan ku dikeve bakûrê bajar yek jî gundên ava û xweş û boş e ku zêdeyî hezar kes lê dijîn.

Berhemên wan çandina ceh û genim û tirî ye. Piraniya Zeydaniyan niha li Laînê li herêma Kelatê ne.

Sîl Supuran (Şahseven):

Ew navê hana wekî bê texmîn kirin tirkî ye; ji alî Osmaniyan ve li vê êlê hatiye dayîn û di wata kesen ji xwe şunda tiştekî neynin, yanê reşdikî ne. Bi rastı jî vê êlê cîhên tê re derbasbûyî xirave diki ri ne pişt xwe tiştekî nedihîştive. Dîsa navê Şahseven jî tê wata kesên ji Şah hezdikine. Bere jî nivîsîbû ku ew beşekî Celaliyan e, yanî ewên serhildan kiribûn yek jî ew êla bû. Pir mixabin ku em hîna jî navê wan ê kurdî nizanin. Mamoste Tewahûddî dibêje: Sîl-supuran gundekî ji rêzegundên Cîristanê yê li herêma Bajgiran e. Sîl Supuran li ser tixub dijîn. Kurdên Sîl-supur jî hevalbendên Şah Ebbas bûn, lewra jî ji wan re digotin Şahseven. Ji ber vê yekê jî li Kela Dimdim bi Kurdên Celalî ve li dijî Emirxanê Biradost şer kirin. Qûrçiyên Celalî, Pazûkî, Kurdên Bavanî (Bovanlo) û Gêncelî Canê zîk hakimê Kandeharê ku gişt Kurd bûn û dijî Emîrxan şer kirin û koka Emîrxan qelandin, lê ya rast ewe ku bi vê yekê koka xwe jî qelandin.

Di sala 1012 ên qemerî (1594) de, Kurdên Sîl-supur li Kurdistana Tirkiyê gelek Romî kuştin û male wan talan kirin û wekî reş bikî derbas bûn loma ji wan re dibêjin Sîl Şupur, wekî Şah Ebbas dibêje; "Sel gibî süpürdüler " ango wekî lehivê malîn.

Nûserê pirtûka Arayê Ebbasî dibêje: wan Kürdana ji wê demê vir ve he v oka b i tirkî ya "Sîl şupur" wekî nav ji xwe re d anîne. Bûne Şah Seven û nêzîkê 2000 malbat in. Rû kirin dergeha Cehan Penah (Şah Ebbas) û li her wilayeta Romê ku lê derbas dibûn her tişte ku didîtin talan dikirin, mezin û rû spiyê wan bo secdeya Şah Ebbas diçûne ber kela Erîvanê. Ji bo ku bêne hebandin û her wisa ji bo ku li wîlayeta Rêy, Sav, Xar û Fîrozkûh bo tayifa xwe zozanên havîn û zivistanê peyda bikin ber bi Iraqê ve çûn. (Ji pirtûka Alemê Arayê Ebbasî rûpelên 648 û 782) Nivîskatê pirtûka Metleoşşems jî qala Emirêl- Omera Kebl Elî Xanê Sîl Supur Beylerbegî û hakimê Meşhed pîroz dike ku ji Qûrçîbasiyanê dema Şah Silêmanê Safewî bûye û di nivîskekê de ku di sala 1091 ên qemerî de (1673) li ser derê kerwansaraya Şahverdî Begê nivîsî bû, navê wî jî têde heye.

Sêvkan (Keykanî-Bîçerî):

Ji herêma Sîwerek an jî Sîwek li Kurdistana Tirkiyê tên. Kurmancên Xorasanê yek ji girîngtirîn parêzerên ziman û çanda Avesta û Zerdeştî ne. Gelek taybetiyên zimanê Avesta parastine. Bo nimûne mirov dikare bêje ku ew "w" bi carekê dibêjin an ku telafuz dikin ku kesek bilî Kurmancan nikare bêje. Lewra jî "w" di peyva "Sîwkan" de wek "w" ya Avestayî bikar tînin. Hinek jêre Sîvekan jî dibêjin. Seadetqolî Xanî Qobadî di nameya xwe ya ji bo kurê xwe Siyavûş Xan de binê namê wiha îrnze dike: "Seadet Qolîxanî Sîfkanlo". (193) Mamoste li wir dikeve şaşitiyê, lewra tu têkiliya Sêvkan bi bajarê Sîwerek

re nine. Tenê herdû peyv nêzîkî hev in. Sêvikî bi piranî li herêma Semsûr û Meletiyê jiyane. Navê Sêvkan, ji begê bi navê Sefo yan jî Seyfeddîn tê.

Piraniya şeren navbera îran û Romiyan li ser Kürden Sîwerekê bûn, ji ber ku ew zêde alîgirê Iranê bûn. împaratoriya Osmaniyan hertim ew tehrîk dikirin û li hember wan komplo çedikirin û biryarên derew didane wan. Heya ku Sîwerekê bixin jêr destê xwe. Sî were kî ku beşek ji êla Çemîşgezek bûn bi serokatiya Ristem Begê Çemîşgezek piştgiriya Şah Îsmaîlê Safewî kirin û ew li dijî împaratoriya Osmaniyan bi hêz kirin. Ji wê demê wir ve jî, Kürden Çemîşgezek yek ji binexwedanên Hikumeta Safewî têne naskirin.

Peşketina wan li nav Xorasanêbi serokatiya Şah Elî Siltanê Çemîşgezek ve bû. Ew jî wek êlên Kurmancên din li deverê bi cîh bûn. Her ku di beşa Bîçeran de hate gotin, Bîçeran, Sêvikan û Kîkan her sê taîfe li jêr navê Kîkan kom bûn û bûne yek. Li hemû herêmên ser tixubê Iran û Xarezmê bi cîh bûn ku îro jî Aşxane ya Bocnûrdê û Cirîstan li Bakûrê Şîrvane heya Deregezê belav bûne.

Nasireddîn Şah di Sefernama xwe ya sala 1300 (1921) an de, li Xorasanê Kîkan, yek ji girîngtirîn êlên Zeferan binav dike û hejmara nifûsa wan 5000 malbat dinivîsîne. Dibêje, ku ew ji ber mêranî û lehengiya xwe parastina tixuban pejirandineû wê yekê bi cîh tînin. Serokatiya êla Kîkan, gorbelgeyan di deste Emîrên Sêvikan de, yê ji malbata Qobadiyan bûne. Di dîrokê de xizmetên mezin kirine û bi navên mîna Bîçeran, Kîkan û Sîvekan hatine naskirin. Yê herî girîng ji wan Hatem Begê Bîçeranî ye ku di daweta Nadîr a bi keça Sam Beg re, ku gelek xwîn ji bo wê hatiye rijandin. Wezîfa anîna bûkê li bajarê Şîrvane bo Meşhede hebû. Hatem Beg û begên din yen Kurmancan li wêderê paşnavdn Xan bo wan hatiye dayin.

Navê serokên Kîkan, paş Hatem Xan, li gor sened û belgen di dest nivîskar de ne wiha ne:

Mohebbet Xan Kîkan: Kurê Hatem Xan e.

Mohemmed Begê Kîkan: Kurê Mohebbet Xan e û gundê nû yê Oxazê li gor seneda 1130 (1710).

Hatem Xanê II: Kurê Mohemmed Beg e.

Mohemmed Begê Kîkan: Kurê Hatem Xan, Qebale (Sened)a sala 1226 ên qemerî (1825).

Mohemmed Hesen Begê Kîkan: Kurê Mohemmed Beg qebale seneda 1245 ên qemerî (1827).

Seadet Qolî Xanê Kîkan: Kurê M. Hesen Beg, seneda sala 1285 (1865) ku tev li şere Aqderbenda Serexsê di sala 1279 ên qemerî (1861) de bûbû û tê gotin ku bi fermana Emir Hosên Xanê Şacaoddole bi tifingê Qodretollah Aqa Roşenî kuştibû.

Hatem Xanê Kîkan yê III an: kurê Seadet Qolî Xan e.

Mehemmed Hesen Xan Şexolxevanîn Sîvekan: Kurê Hatem Xan e û di sala 1310 an (1931 zayinî) de çû ber dilovaniya Xwedê û tê gotin ku gelek zana û bi aqil û siyasetzan bûye.

Seadet Qolî Xanê Sîvekan: Kurê Mehemmed Hesen Xanî ye ku kesek rewşenbîr, peşverû û demokrat bûye û di sala 1314 an rojî (şemsî 1935) an de wefat kiriye.

Qadî Qolîxanê Qobadî yê Sîvekan: Birayê Seadet Qolixan ku hê jî dijî. Tev-gera wan ya herî dawiyê Serhildana wan ya mehên Tebax û Ilona sala 1320 (1941) an de bû ku bi serokatiya Ferecollah Xanê Bîçeran pêk hat û paşî şikest xarina wan 1İ hember Arteşa Şah û girtin û darizandin û teb îda Xan an êiên Kurmancê Xorasanê)i hev belav kirin û ew gelek lawaz kirin.

Günden Bîçerî (Şamlû) ev in: Adîne Qulî, Ulaşli (Şîrvan), Inçeyî Keykan (Qoçan), Bûrcû Zulfîkar (Ş), Bûrc Kale (Deregez), Berder, Bibehre, Zakîran,

Zortanlû, Serdarabad, Kale Beg, Dewletxan, Kalteman, Qeletê Balî, Qeletê Çinar, Bîg, Tûranlû, Tirk, Çarkaldî, Xezkanlû, Xelaçlû, Dûav, Taşlikale, Dûrbadem, Gedıganlû, Gûlîl, Lûcelî, Mihemed, Naman û Hinema ne.

Yekê jî pêwîste bê zanîn ku di nava serokên Keykan, Bîçerî û Sêvikan de gelek Xane bi navê Canbegê hene. Hinek Xane jî nave xwe Qelehesen in. Dibe ku navê gundê Kelhesanê ya li Anadolê ji wir tê.

Serdarên Keykanî

Memed Can Keykanî (1120/1702)

I

Tûhîd Xan Begê Bîçerî (1140/1722)

4

Axa Beg Kupan

n Memed Can Beg (1160)

fl H

Hesen Begê Çemîşgezek

D n G G Tuyîd Beg - Sencer Beg

Remezan Begê Qelehesan Axa Can Beg

n n n V

Fet Eli Beg (1220)

n

Ferêcûllah Begê Serhedî Hesen Pehlewan û Kerîm Beg (1285) Cefer Xan Beg (El begê Kevki

n n n n

Remezan Bee (1330) Heyder Xan EH Xan

n n n Mîhrab Beg

n

G V G Fercûllahû Bîçeran Elî Beg Hesen Xanî G

Kerîm Xan

Günden tayifa Sîvekan ji Deregezê haya Şîrvane rêz dibin û hinek ji wan hê jî di konan de dijîn û hê jî koçber in. Ew günden wan wiha ne: Oxaza

Kevn, Oxaza Nû, Ulaş, Bivan, Şerkan, Çepan, Şokran, Xodkan (Xokan), Sefkan, Zortan, Zaxûran, Xoraskan (Xirskan), Bîvare (Biyare), Dûr Badam, Imam Qalî, Şark, Kela Sefa, Bajgiran, Qer Çoxe, Kela Velo, Qizilqan, Bîr Zeynel Beg, Çar Bire, Kela Çûq, Deh 0 Danlo ku li gundê bi navê Tork nêzîkê tixub li bakûrê rojavayê Şîrvane dijîn. Dema zivistanê konên xwe dibine navbeyna Bîgan û Sîsabê ku dike ve bakûrê fabrîqa şek ir ya Şîrvane.

Ela Sevi kan yan ku nivîskarê vê pirtûke jî yek ji wana ye, li bajarên bakûrê Xorasanê û Tehranê belav bûne û piraniya wan di karên îdarî û çandı û bijişkî de xerîkin û kar dikin û xizmeta gelê xwe dikin.

Beşa din ya Sêvikan li Kurdistana Tirkiyê mane. Hêja Qolam Hosên Rehîmiyan dibêje ku di serê cîhanê ye yekem de hinek ji fermandarên Kürden Sêvikan yen Tirkiyê dîl ketibûne destê Rûsan û li Sibîryave zindanî bûn. Gor nexseyên ku hebûn, ew dizanîn ku Kürden Sêvika li herêma Bacgiranê dijîn. Paş zor û zahmetiyan karibûn xwe bigihînine Bacgiranê û bavê min ew gazî kirine mala me û qedrê wan girtiye. Ew her wisa di axaftinên xwe de digotin ku li Tirkiyê jî malbata Qobadiyan serokativa êla Sêvikan dikin.

Şeran:

Bi mêraniya xwe bi nav û deng in. Hinek ji wan li bakûrê Qoçanê di konan de dijîn û xerîkê karê heywandariyê ne û nêzîkê 20 kerî pezên wan hene. Şeran li gor texmînan dibe ku ji "Şervanlo" û "Şîrvanlo" hatibe. Şîrvan navê yek ji êlên xwedî hêdbar yên Kurd ku berê li herêma Loristanê zozanên havîn û zivistanê hebûne û li wêderê bajarê Şîrvanê ava kirin. Paşe bo zozanên zivistanê pez çûn Başûn? Kurdistanê. Li vêderê gundek bi vî navî hebû û ji wêderê jî çûn Qefqasya bajarên Şîrvan û Êrîvanê ava kirin. (Ewa sedî sedê ew xete ku Kurdên Şamâ jî di wê rêyê de çû ne) Di nav Xorasanê de jî bajarê Şîrva^ yê îro ava kirin û ev bajara yek ji bajarên serekî ye, ku ji aliyê Kurdên Zeferan ve hatiye damezirandin. Piştî wê Qerexan kurê Şah Elî Siltan (Şah Qolîxan) navenda êlê ji Şîrvanû bire Qoçanê û di avedankirina wir de roi lîst û ji bo tûkoşîne cîhekî baştir bû. Piraniya Şeraniyan di konan de dijîn û hinek jî li gundê Şehranlo ji rêzegundên Çirî ya Qoçanê dijîn.

Merdûx dibêje: Şîrvan nêzîkê 1500 malbat in û li Hewlêrê dijîn. Şîrvanî: Ew tayfe ji tayifên Kurdên Iraqê ne, dibe ku beşek ji êla Sîrvanê bin ku ew jî du beş in: Kirnî û Irevanî. Wîlîam Egelton nifûsa Şîrvanî ya li Kurdistana Iraqê ku li qiraxa çemê Zê dijîn, di sala 1906 an de 1800 malbat in dibêje. (Ji pirtûka Komara 1946 ya Kurdistanê bi wergerandina Seyid Mohemmed ê Semedî rp. 93)

Şîrvana Xorasanê di sala 1300 (1921) de li gor Senbeoddolê di pirtûka Metleoşşems nêzîkê 1500 malbat bûye. Di van salan de bajar pûşve çûye, lewra hersai gelek ji Zeferaniyan dest ji jiyana konan berdan û li bajarê Şîrvanû bicîh bûn. Beşeka pir a ji Şeraniyan hê jî di konan de dijîn û hinek ji wan li gundên Şah Mohemmed li bakûrê Qûçanê bi cîh bûn.

Şex Emîran:

Bi navê Şex Emîran bi nav û deng in. Li gundê heman navî li bakûrê Şîrvane nêzîkê tixubê Iran û Rûsyaye dijîn. Dibe ku esle wan bigihîje Şex

Be¬sen Beg, yek ji emîrên Çemişgezeke yê bi nav û deng e. Ji ber ku emîrên Kürden Xurasanê ku serokê ela Çemişgezek bûne ji vê êlê bûne. Tê gotin ku Şêx Emîrî bi dilsafî û sadeyiya xwe di nav Kurdên Xorasanê de bi nav û deng e. Lê belê di dîrokê de mêrên bi nav û deng li nav wan de peyda bûne ku malbatên Şocaeddolû, Raşenî û Nigehban li Şîrvane ku serokê bakûrê Xorasanê bûne ji wan in.

Şexkan:

Yek ji êlên herî mezin ê Kurmancên Xorasanê ne ku li bajarên Qoçan, Meşhed, Çinaran, Deregez, Kelat û Esferayînê dijîn. Karê kişt, kal û kêmekê jî pez xwedî dikin. Beşa din a Şâxkan li bajarê Xoyê li wîlayeta Ezerbeycanê, rojavayê Iranê û hinek jî li Kurdistana Tirkiyê dijîn. Kurdên Şêxan yên Xorasanê ku li Çinaran, Kelat û Me§hedê dijîn, di anîna Nadir Şahö ser desthilatdarivê û her wisa ji text xistina wî de roleke mezin lîstin, ku Şah^rdî xanê Şâxan bû. Wekî din Silêman Beg, Qoce Xan û Şikrî Beg birayê Nadîr ji wan kesan in. Jin û keçên Şêxan, di §erên Iran û Romê de di dema Şah Tehmasbê yekan an de raste rast di eniya şer de beşdar bûn û tifinga mêran ji bo wan tijî dikirin ku ew pê li dijmin xin. Her wisa karê rakirina birîndaran bo derveyî meydana şer û peyda kirin û anîna xwarin, av û tiştên hewce yên din ser milê jinên qehreman yên Şêxkan bû û Merdox dibêje; ku eslê wan digihîje Şûxekan ku li Tirkiyê navbeyna Bedlîs û MC^ê dijîn û li gel êla Cibran ku 2000 malbat in bûne yek.

Xortên Şêxan

Merdox nivîsiye, ku Emar 2000 malbat in û li başûre Gîlanê navbera Rûdbar û Qezvînê bi cîh bûne û çend tayifên ku Qebe, Qeran, Şemkan,

Beşan, Behadir û Şahkelan çend tayife ji wan in. Emîn Zekî jî wan bi "Enbar" û "Amar" dide naskirin ku nivîskar jî ser wê baweriyê ye.

Qaçkan:

Hinek kes wan ji êla Qoçan dizanin û dibêjin ku ew ji berevajî kirina Koç-Koyûn çêbûye. Divê em bibêjin ku qoç tê wata beran (pezên nêr) û qoyûn jî tê wata mîh (pezên mê) û ne hewce ye ku mirov bêje Qoç-mî tê wata "nêr û mê". Eger bê gotin ku "Qaş qoyûn" bûn baştire, ji ber ku Qaş tê wata pezên Spî ku dora serê wî reş bin. Qaçkan li gundekî bi heman navî li bakûrê bajarê Qoçanê dijîn. Jinên wan kincên Kurmancî yên xweşik li xwe dikin, ku ji terza Qeremaniyan e. Qaçkan, yên din li Dîzavend li 12 km û Ce efeabad li 15 km ya Qaçkanê dijîn û hinek jî li gundên Deregezê yên wekî Şemsî Xanê dijîn. Nêzîkê 200 malbatên Qaşkanan hê jî koçber in. Zivistanan li Deregez, Serexs, Meravê Tepe û havînan jî li çiyayên Hezar Mecid li mintiqa Daş û Kanî Sarê dimî- nin. Serokên êlê Ehmed Qaçkan û Hecî Mohemmed Rehîm Recaî yê Daçkan bûne.

Qereçor-lû:

Qereçor yan jî Qereçolo yek ji girîngtirîn êlên Zeferan yê ku cîh û warê wan yê eslî li bakûrê Amedê û rojhilatê Cola Wanê, li bakûrê Kurdistanê ye. Kela Qere Çolan yek ji kelavên bi nav û bang li Kurdistana Tirkiyê bû ku wekî dibêjin dewleta Tirk di van salan de bendavek çekiriye ku zevî û erdên Qere Çoliyan ketiye bin avê. Qala zîrekî û şervaniya Kurdên Qere Çorlû ku ji Kurdên mêrxas yên Xorasanê ne ha tiye kirin ku li dijî Şaire Efşar şer kirine. Çeperên ku Kurdên Qere Çorlû ser rêya Şîrvan Bocnûrdê çêkirin û têde li dijî Nadîr dema ku ji deşta Qebçaqê dizivirî şerekî dijwar kirin hê jî ser dola ku ax ketiye aliyê rojava ya fabrîqa şekir ya Şîrvaıre û heya nêzîkê gundê Sîsa direje mane. Ew şeren Qere Çorlûyan bi fermandariya Necef Siltanê Qere Çorlû di dîrokê de cîhekê taybet nivîsiye. Ew şer heya ber bi rêzeçiyayên Aladax û Şahîncanû ve jî çûn û

paşû ji ber ku Nadir Şah di warê topxanê de xwedî hêzekê mezin bû ku bi serket û Necef Siltan mecbûr kir ku aştiye bike. Necef Siltanê Qereçor di dema çavpêketin û lihevhatina gel Nadîr de wiha got: Ji berê heya îro, nêzîkê 300 sal in ku Kurd li vir dijîn. Her rih li berek dibe ku tevahiya welatê Iranê pê agah be ku ji şûre gelê Qereçorî tirsiyane û niha jî cemeta Zeferan û Kîvan ku bêtir nêzîkî te bûne bin ûşa fitnê ne. Ji wê rojê wir ve Nadir xwest ku dilê Necef Siltan xweş bike û Kurdên Qereçor jî razî bike. Qereçoriyan jî karîbûn hatina xwe nîşanî Şah bidin. Şokir Begê Qereçor di nav êlê de ma û serdarên din yên Qereçorî bi fermandariya Necef Siltan di kela Nadir de çûne şeren Herat, Iran, Romê û di leşker kâşiya Nadir de ji bo Hindîstanê roleka mezin hebûn. Piştî dema Nadîr û piştî ku gelek ji serdarên wê êlê di şeren dema Nadîr de hatine kuştin, Êla Qereçorî kete nava zor û zehmetê, ji ber ku Nadir êdî nemabû.

Lewra ji Necef Siltan, Ristem Begê Qereçor, Şahbazek, Mûhammed Riza Xanê Qereçor, Mohemmed Xanê Qereçor û yên din nedikarîn tiştekî bikin, ji ber ku mêrên mezin 1i cem tnêrên mezin perwerde dibin. Dema Şah Rox û Şah Siltan Hosên û yên wekî wan jî zeîf û lavaz digeheştin. Zanînên niviskarî li ser wê êlê û bûyerên pişti Nadir heya dema Riza Şah hindik in. Lê di dema Meşrûde de ye, ku carekî din Hosên Qolixanê Qereçor mêraniyê dike; jin, zarok, mal û milkê gelê Sebziwar û herêmên devera wê ku demeke dirêj bû di bin simê hes- pên Ozbekan de bûn, ku li têya Sahrûd-Sebziwarê dihatin û ew talan dikirin, rizgar kirin. Di wê demê de kesek di xema gelê Sebzîwarê de nebû heya ku Hosên Qolixan hat, §erô talanker û dagirkerên Ozbekan kir. Ser xençera xwe hilanî û anî Meşhede û bi wê awayî dilê gelê Xorasanê yê daxdîtî derman kir.

Hosên Qalî Xan ku apê hêja xanlerxanê Qereçor bû, bi destûra Riza Şah û bi alikariya Emîrcan Mohemmed Xanê Qaçar fermandarê arteşa rojhilat

(Meşhed) tevî 70 heval û mezinên Kurdên Xorasanê yên wekî serdarê mezin yê Kurdên Şadî hatine tir baran kirin.

Hosên Qalî Xan, kurê Hecî Mohemmed Elî Xanê Morteza Qolî Xan ku bi Xan Nayîb navdar bû, kurê Hecî Sebz Elî Xanê Qereçor bû ku hikumeta Somleqan Şûxan û beşek ji tayifên Goglan di Inçe Emend û Gilîdax û deverên wê birêwe dibir. Dibe ku ew Sebz Elî Xanebît ku Mohemmed Hesen Xanê bavê Aqa Mohemmed Xanê Qaçar kuştiye. Kurdên Qereçor gişt cîgir bûne û li de¬vera Bocnûrd û Aladax û bi taybet li Şûxan û Somleqan, Toyzar ya Esferayinê û Qûrî meydanê karê çandiniyê dikin û hinek pez jî xwedî dikin û navenda wan rêzegundên bi navê Kurdên Qereçorî navbeyna zozanên havîn û zivis- tanê yên Kurdên Xorasanê li herêmekê ne ku av û hewayê wê xweş e dijîn û hewce nîne ku koç û bar bikin. Jiyana wan li gorî yên din baştir û rihettir e. Hinek ji Qereçoran li Xwarû- Veramîn, Demawend û Meşhede û hinek jî li Dergezê dijîn.

Nasireddîn Şah di Şerefnama xwe ya di roja yekşem, çarê heyva zîheccê sala 1300 an de wiha qala Kurdên Qereçorî yên herêma xwarê dike: "Divê îro em hiçine bo pavê xwar. Nêzîkê cihê rawestana me 400 siwarên Ûsan, Qe¬reçor û Hudavendê Ebolcemî Emine Siltan ku li xw'arê dijîn li gel mezinên xwe ser rêya me bo rêzgirtinê û silav kirinê rawestivabûn. Seyfollah Xan serokê Usan, Sefer Elî Xan serokê Qereçoran û Rehîm Xan serokê Hudavendan hatine hizûra me." Her wisa Nasireddîn Şah li Bloka Yatrîxwar qala du gundê bi navê Hosên Abad û Elî Abad dike ku Kurdên Qereçor lê dijîne.

Gor agahiyên min li Xorasanê komkirine êlên Qereçoran ev in: Sîlûr, Şaqulî, Dewelî, Qere Welî, Kersan (Sersan) in. Li gundên bajarê Aşxanû yên mîna: Gazî, Şerebadî Kurd, Şaaba, Qele Necef, Çîlîk, Qelê Mûsalî, Qelê Mola Hesen.

Qereman:

Wîleyeta Qereman li Kurdistana Tirkiyê li rojhilatê derya Wane nêzîkê Sêvvasê û derya Reş e. (153) Ew bi tevahî şaş e, Qereman bajarekî li başûre Tirki- yê, di navbera Qonya û Behra Spî de ye, hinek Kurdên Kurmancî axêf lê dijîn. Berê paytexta dewleta Kurdên Qeremanî (Bi tirkî Qeremanogullari) bû. Pişti ku dewleta Osmaniyan li dinyayê fireh bû û li nav emîrzadên Qeremaniyan de li ser desthilatdariyê nakokî derketin, emîrên ku şikest xwaribûn berê xwe dane siltan Muhemmed ïmparatorê Romê (Osmanî) û xwestin ku bi alikariya Osmaniyan herêmên Qereman dagir bikin. Di wê demê de li Iranê jî desthilat- dariyake yekgirtî tunebû ku piştgirtiya matê Kurdên ku li ser tixubên Romê dijîn bike. Di sala 873 an de yek ji emîrên Qeremanan çû cem Uzûn Hesenê Aq Qoyûnlû ku ji bo warên xwe yê zivistanê ye li Tebrîzê danîbû ji wî destek xwest. Lê Uzûn Hesen bi xwe re nedidît ku bi Osmaniyan re şer bike û dax- waza Qeremanan red kir. Bi vî awayî Qeremanên ku hêviya xwe bi îranê re nemayî tevlî a^şa Romiyan bûn. Di şerci sala 877 (1498) an de, ku navbera Uzûn Hesen û Romiyan de qewimî de beşdar bûn û Uzûn Hesen şer winda kir. Di gel peydabûna dewleta Sefawiyan, piraniya Qeremaniyan gihîştine Şah Ebbas û bûne xwedî statû û hêz. Yek ji kesên herî binavbang yê wê demê Bi¬ram Begê Qeremanî ye, ku bi xwîşka Şah Ebbas re zewicî.

Jinên Qeremanî

Bi dîtina min di vê îddeayê de kêmasiyek heye, ew jî, dîtina ku bi gihîştina Şah Ebbas, ew bûn xwedî hêzê. Di beşa Qeremaniyan de jî min nivîsî bû ku yek ji koman bi hêza Safewî damezirandî Qeremanî ne. Eger Qeremanî û hêzên din ên Kurd nebûyana Safewî jî Şah Ebbas jî dernediket holê. Li ser milê wan Sefawiyan hêz komkirin û bûn dewleteka mezin.

Bîram Beg, Xorasan ji destê dagirkerên Ozbek rizgar kir û tixubên berê yên Xorasanê carek din çêkir û dest danî ser Herat û Belhê. Di sala 967 an de ji ber mêrxasî û netirsiya xwe ku çûbûn nav dilê dijmin de hate kuştin. Wekî din mirov dikare qala Zolfeqarxanê Qereman bike ku di îdare kirina welat de,

piştî Şah vvek kesen heri bi hêz û xwedî desthilat bû û di dema Şah Ebbasê yekan de li niqta heri bilind bû û paşe jî bi destê Şah hate kuştin, ji ber ku Şah ji hebûna wan ditirsiya.

Mayvan, Igan, Qasiman, Şadkan û Heşt Merxî ji êtên Qereman in. Nivîskarê dîroka Qizilbaşan dinivîse: "Emir Qereman di dema Qere Yûsûf (yek ji emîrên Beraniyan) ji hemûyan mezintir bû. Di şere Siltan İbrahim Paşe yê Şîrvane de mêraniyeke mezin kiribû. Her vvisa qala Pire Qereman Emire mezin Biram Begê Qereman û yar Ehmed Begê Qereman jî dike.

Qeremaniyên Xorasanê gelek jêhatî û mêrxas bûne. Hêja Ebolfezl Qasimî dibêje: Li Xorasan serokê êla Qereman alîkar û piştvanen Nadir bûye. Berê ku Nadir bibe Şah serokê heri dawî yê Qeremanan gelek netirs û jêhatî bûye. Welî Xanê Qeremanî yek ji wan kesan e ku hem bû sebeba kuştina Ceco Xanê Zeferan û hem ji bû sebaba serkevtina Kurdên Xorasanê li hember Ko- lonel Mohemmed Teqî Xanê Pesiyan. Êla Qereman li bin çjyayê Şaycane dijîn; nivîskarê dîroka Qizilbaşan bi şaşî Qeremanan ji qewmên Tirkên Selçûqî yen Akkoyûnlo binav dike. Lê tê zanîn ku di Kurdbûna wan de ti cihê gumanan nîne. Ji ber ku ji herêma Qereman ku di bin desthilatdariya Osmaniyan de bû, Qereman, piştî ku ji bo alikariya Şah Ismaîl çûne nav Iranê her bi navê welatê xwe yê eslî Qereman hatine binav kirin. Herêma Qereman li rojhilatê derya Wanê ye. (m> Min di beşen din de jî nivîsî bû, ku beşekî Qeremanan, piştî hihveşandina Beraniyan tevlî Pezgewran bûn. Mirov dikare bibêje ku ew bûne du parçe; yekî Safewî damezirand ya din jî tevlî Hesenê Dirêj bûn.

Kawî-yan:

Bi Kavan jî bi nav û deng in. Tê gotin ku Kawa yê Hesinkar, Kurd li dora komkirin û dijî Dehak serhildan pêk anî û Ferîdûn anîne ser text. Yek ji wan Kawayiyan e ku di demên pişt re Kurd xwe ji Kawe dizanin û navê xwe danîne "Kawe'î" û paşe jî bûne Kawanî. (193) Kawî li bakûrê Kurdistanê li bajarokê Kolik-Semsûrê jî hene. Di sedsala XVI an de li Semsûrê girêdayî kon¬federasyona Reşiyan e. Ji alî rûhiyat û qerekterê ve jî wek Reşiyan e.

Kox Binik:

Dîrokzan bi taybet Muhemmed Kazim di pirtûka Alemê Arayê Nadrî de dibêje: "Ew Koxbinik in." Lê belê ya rast Kox Binik e. Herêmêka di navbey-na Kora, Espçîr, Tîtkan, Zeydan, Dovletxane û Şexkan de ye. Navê Koxbinik ji Kox li hember Kax anko qesr û serayê tê. Hinek ji kesên ku li Koxê dijîn re dibêjin "Kloxnişîn" an ku kesên bê ser û ber, kesên belengaz, kesên ku li nav klox û axê de kardikin, dijîn û bi rêya çandiniyê jiyana xwe didomînin. Helbet Kloxnîşin an jî Koxnişîn li hember "Çarvadaran" dihate gotin. Ji kesên ku pez xwedî dike û di konan de dijîn re Çarvadar digotine. Çarvadirî ku geleke azad û serbest bûn; li çolê dijîn, jiyana li xwezayê bi ya bajar, gundan, şer t û mercên jiyana bajarî û temedonê nediguherîn. Bi çavêkî biçûk dîtî ji gundiyan re di-

gotin koxnîşin an jî kloxnîşin. Desthilatdariya Koxbinik di wê dema dawiyê de di destê Mîrên Roşenî ji xizmên Roşen Xanî de bû. Muhemmed İbrahim Xan Roşenî berê serokatiya êla Zeferan, hakime Kox Binik bû. Piştre ew meqamê xwe (hakimi) da kurê apê xwe Esi an Xan. Eslan Xan jî ku her tim li bajarê Qoçanê dijî desthilatdariya vêderê siparte zavayê xwe Seadet Qolixanê. Oxazî gêncekî Şerzan û jêhatiyî bû. Dema ku Kolonêl Mohemmed Teqî Xanê Pisiyan eriş bire ser Qoçanê Seadet Qolîxan jî ji Koxbinikê birê ket û xwe gihande Xan (mezin) ên Zeferanî.

Kîkan:

Hate gotin ku Kîkan yek ji êlên herî mezin yê Zeferaniyan e ku li seran-serê tixubên bakûrê Xorasanê ji Aşxana, Bocnûrdê bigre heya Dergez û Qo¬çanê belav bûne. Nasireddîn Şah di Sefernama xwe de bi girîngî ser Kîkan radiweste û hejmara wan 5000 malbat dinivîsîne. Ela Kîkanlo berê havînan li bakûrê Azerbaycan û başûre Qefqazê bûn û zivistanan jî ber bi herêmên germ yen Kurdistana Tirkiyê ve diçûn.

Kıvan:

Yek ji girîngtirîn êlên Zeferan e ku li herêma Çinaran, Rasekan û De-regezê bi cîh bûne. Heja Ebolfezlê Qasimî dema qala bersîngana (çûxê, gilaş) ya Kurdên Xorasanê dike navê Kazim Begê Kîkan jî Radikan ê tîne. Ji ber ku Kîkan li Serhedê dijîn ne li Radikanê. Nasireddîn Şah jî di Sefernama xwe de qala giringî û rola Kîkaniyan dike. Nisamosedsalaeltenê apê Nasireddîn Şahe jî dema ku ji Qoçanê tê Meşhede li Radikanê radiweste û ji aliyê Xanler Xanê Kîvan ve tê peşvvazî kirin ku hevrêyên Hisamosedsalaeltenê ji mêvandestî ya Xanlar Xanî û bicîh anîna hemû pêdiviyênle§kerên Hisamosedsalaeltenê ecêb- mayî bûn.

G. S. Nîpîe, subayê ragihandina Ingîlîzan ku bo sîxuriyê di sala 1291 (1873) de hate Xorasanê, di warê pûşveçûna Rûsên dagîrker de helwesta Kur¬dan û Ozbekan li hember wê dagirkeriyê lêkotîn bike. Ew, qala hejarî, belang- azî û derbideriya gelê Iranê ya li wê demê dike û dibêje: Gelek kes ji ber hişkî û birçîbûnê mirin. Lê dema ku ew dikeve nav herêma Radikan dibîne ku rewşa jiyana gelê Kurd li wêderê rihet û xweş e. Ecebmayî dibe û hemû gundên wê deverê bi taybet Tevîl û Yûsûf Abadê dixe bin çavderiya xwe ku gelên wan gundan gelek keyf xweş, rihet, xweş rû, rind û cîhê wan jî bi şînahî, pir av, bax-baxçe û rezên wan tijî mêweyên cûr bi cûr yen wek tiri û sêv in û keriyên pezên wan jî qelew û serxwe ne.

Li bara qiyafe û tîpa Kurdên Kîvan de di¬bêje, ku "Hemûyan kincên bedew û xweş li xwe dikirin û ez bê hesiyam ku ew mêrên bejin kurt, lê hestî gir û bi hêz in. Di nav wan de çavşîn pir zêde hebûne". Nivîskar dİ wê barê de dibêje, ku "Min jî zanî bû ku çavê wan e rûyê wan xweşiktir dike. Gîşt êla Kîvaniyan nişstecîh bûne û karê çandinî, baxdarî yê dikin û li cîhê xwe de pez jî xwedî dikirine. Welatê Radikan ji bo çêra pez,

karê çandiniyê baş û kêrhatî ye. Navenda Kîvaniyan gundê Radkanê ye, ku peş erîşa Cengiz Xanê Moxol xwedî girîngiyek taybet bû û gelek avedan bû. Serokê êla Kîvaniyan di dema Nadîr Şah de Xoda Bexşe Kıvanan bû. Torsan, Goverişkan û Miyan ji tayifên din yen Kıvanan in.

Goliyan:

Dibe ku evv ji "Golmanrûd" ji Loristanê bûn, Bedlîsî di Şerefname de qala vê yekê dike. Di wê demê de yek ji girîngtîrin êlên koçberên Xorasanê ne ku havînan li rêzeçiyayên Aladax nêzîkê Şûxan û zivistanan jî li "Berojî" Meravê Tepe li qiraxa çemê Etrek û nêzîkê Aytemûr û Aq Gemiş pez xwedî dikin. Ji wana hemûyan girîngtirîn û bi nav bangtir Hecî Axa Xan û Şah Riza ne ku her yekê 3000-4000 pezên wî hene. Di dema rêjima Şah de ku mêrg û zeviyên Goliyan li Aladaxe ji aliyê dewletê ve hate qedexe kirin û beyî ku ji bo wan mergan bidin, karê Goliyan pir zehmet bû, ew jî kêmekê berxwe didin, lê belê li hember a^şa Şah ya bi çek nikarin karekî bikin û ji hev belav bûn û her desteyek çû aliyekî. Bi taybet Aqa Xan çû Çiyayên Oxazê û yek-du salan li çiyayê "Petlegah" zozan danîn. Lê piştî bi serketina şoreşa gelê Iranê carek din êla Goliyan zivirîne ser cîh û warên xwe yen li çiyayê Aladax û niha jî li wêdenê dijîn û berhevên xwe yên ji pezên xwe yên bên firotinê rêdikin bajarê Bocnûrdê. Êla Goliyan gelek şerzan û mêrxas in ku ew jî di dema bihurî de tevî Qereçoriyan çûne şer heya dema ku êla Qoliya bi yekîtî û ligel hev bûn ti kesê heya Seyid Reşîdû diz û rêgir jî nekarîbûn ji wan bac û xeracê bistîne. Lê ji ber cûdahiya ku

kete nav wan, Seyid Reşîd bi alîkariya desteyek ji Goliyan derbeyeke mezin li Goliyên din xist û Eliyê Golî bavê Aqa Xan di şereke bi nişke de têk bir û zar û zêç û jinên wan dîl girtin û mafên wan binpê kirin. Her ew Goliyana bûn ku xirabkarên Bovan û Ulaşiyan ku li geliyê Kelayinê ûrîş kiribûne ser wan û mafê wan binpê dikirin. Gîş girtin û kuştin. Neyê ji bîrkirin ku gol tê wateya kendal û cîhekê kûr û dibe ku navê Goliyan ji wê hatibe.

Mojdîgan:

Yan jî Mozdakan, ku yek ji êlên girîng ê Xorasanê ne ku tevî Amarliyên Nîşabûre li deşta Marûskê dijîn. Êla Mojdigan, di leşker kêşiya Nadir bo dor û berên Iranê de roleke mezin hebûn. Mesûdî di pirtûka Morevîcozzeheb de qala Kurdên Mozdakan li herêma Cibal dike, dibe ku bê şik ew bin.

Milan:

Her wekî tê zanîn Milan û Zîlan du bira bûne ku her yekî serokatiya êlekê (gereg zend be-Ş) dikiriye. Kurdên Sêvikan navê Zîlan danîne ser çiyayekî xwe yê bilind û qehîm yê di navbeyna Bajgiran û Oxazê de ye.

Hinek ji Milaniyan li gundên "Mîlana Jor" û "Mîlana Jêr" ku navê rêzegundên Cirîstanê ser tixubê Iran û Rûsya qedîm de dijîn û serokê wan yê dawiyê jî Misir Xan e. Cirîstanîyên mayî jî li Esferayin û bin çiyayê Şaycan de dijîn, ku

nivîskare Metleoşşems dibêje: "Tayifa Milan yen ku Kurd 1.000 malbat in u ji

êla (konf) Zeferan in. Li çiyayên Şavcan dijîn û çend gundên wê tayifê hene ku

wiha ne: Qeleyên/gund Doletabad, Qasimabad, Pertan, Ebbasabad, Nuşırvan,

Erdexan u Bidvaz e.

Malbateka Mılan-Şırwan

Serokê êia Milanê Esferayine Emiren Roşeniyan bu, ku ye dawiye Mo

hemmed Ibrâhîm Xanê Roşenî Mözefferosedsalaeltene bu. Hêja Heci Mohem-

med Xane Roşenı kure Mözefferosedsalaeltene di nameyek de ku bo nıvıskare

vê pirtûkê dinivîsine de wiha dibeje: Tayifên Milan u Kurden Esferayine li ku

dijîn û wisa dibêie: Navê 24 deste ji tayifa Mîlan ji ela Zeferan ev in :

Qaniyan: Navbeyna Gelivana Şırvane û Sorxqelê (kela sor) u Zevarim.

Pehlewan: Sorqelê (kela sor) û Hisar Gelivan paşmayiye ela Pehlewan e.

Melevan: li günde derdor in (Paşmayiye ela Melavan e li Bacgirane ne).

Hoseynan: Ser çişme (ser kanı).

Şex Emir: Erdexan-Kelatecat bin deşta Esferayine (Paşvemayı ye ela Şex

Emıran). Li günden bajarokê Haymanê-Enqere jı nene û gündeki bi heman

navı jı heye.

Hesenan-Hesen Abad: Hesenan eleke mezin bûye ku Merdox ela Zeferan yen

Xorasanê beşek ji wan dizane, lewra ji wı gelek tişt aliye Kurden Zeferan de

nedizanî. Evv dibêje: "Hesenan ku Hesenanniye jî dibêjine wan, nêzîkê 3.000 malbat in û li Serhedê, Iran, Iraq û Tirkiya û çiyayê nezik Bediîse û wîlayeta Kerkar dijîn û heşt deste (Tire) ne. Têlye (Ji Têliyên Neyşabûre)

Cakiye, Heyderan, Xorasan (Xoraskanlo ku niha li rêzegundên Oxaza Qoçanê ne û bi şaşî dibêjine gundê xwe Xirskan), Spîkan, Cobran, Zîlan, idman ku ew sê tire dawiyê li Serhedê Bediîse nê. Di rûpela 95 an de dinivîsîne" Spîkan nêzîkê

3.0 malbat in li bakûrê derya Wane dijîn.

Qaçkan: Gêncdan, yen din li bakûrê Qoçanê ne.

Cemalan: Kelê yê Sifîd (kela Spî). Li bakûr û rojavayê Kurdistanê wek Cemaldîna derbas dibin.

Pîrkan-Izî navê gundê wan e.

Sarkan (Sarman): Sarkan û yen din jî li Xoyê û Serhedê Iran û Tirkiyê û piranî jî li Kurdistana Tirkiyê dijîn.

Perkan: navê gundê wan e.

Xaniyan-Qezaqî:

Qolan-Kelatê Sencar û Nesrabadê Serçişme: Hinek di wê baweriyê de ne ku tayfa Qolan yek ji tayifên êla Bîçeraniyan e ku yen din jî li gundekî bi sernavê xwe dijîn li Tekmerana Şîrvane.

Hecîkan: Qasim Xan.

Meskana: Zemanabad (Mesûdî di pirtûka xwe de navê Meskanê aniye).

Qere Şex Emîran: Kelatê Kerbelayî Hesen (Paşvemayî yen êla Şex Emîran in). Mêreban: Çeşme yê Xalabad (Kaniya Xalava ya wîlayeta Mêhreban li Àzerbaycanê ku berê Kurdên Erdelanî lê dijîn).

Xodkan: Çihil Doxteran (Xodkanên din navbeyna Oxaz û Kuran li bakûrê Qûçanê li geliyeke teng û kûr de dijîn ku gel ji ber cîhê wan yê nebaş ji wan ra dibêjin Xodkan).

Pehlewan: Toyzarî (ewana beşa din ya êla Pehlewane ku ew êl bixwe bi "Pelûlan" hafiye naskirin).

Xosrovan: Fertan (Pertan) a berê.

Emîran: Navbeyna Gelïyan û Sorx Qelê li Per Çîn ê.

Cafkan: Can Ehmedî; Ayetûllah Merdox dibêje; "Cat nêzîkî 12.000 malbat in ku her tim li Silêmaniyê dijîn. Ew tayife du tîre ne. Cafê Iranê û Cafê îraqê. Hin malbat jî li Qoçanê ne.

Sîvedan: Kelatê Şerefxanî (Ku Nasireddîn Şah di Sefernama xwe de qala wan di heman herêmê de kiriye). Li gundên girêdayî Cîhanbevlî-Qonyayê jî Sewêdî hene.

Kelmişan (Kelmîsî): Ku li Kelatê Şûr û deverên Siltanabada Sebzîwar û Klîderê bi cîh bûne. Pirtûka binavbang a Klîder ya hêja Dewlet Abadî qala wan Kurdan dike; hate gotin ku ew ne ji êla Topkan in. Piraniya êla Milan li ser xeta tixubê Iran û Tirkiyê û bajarê Xoyê dijîn. Hêja Menû Çehr Kelanterî di meqaleya xwe ya balkeş bi wêneyan şiroveyeke balkeş dike ku ê beşek ji wê jî were qalkirin. Ela Milan li welateke fine û pir bereket li qiraxa çemê "Zengmar"

navbeyna Maku û rêzegundên Qotur yê Xoyê wek gundî an jî konnîşîra dijîn. "Xuya nine ku pevva Milan ji kê yan ji çi hatiye, hinek ji Milaniyan dibêjine ji ber ku mêrekê (Milekê) navê wê êlê di serî de danî, lewra jî je re dibêjin Milan û hinekê din jî dibêjin ku ew ji Mêl naku çiya hatiye. Êla Milan dibe du desteyên mezin bi navê Milan û Xelikanî. Milan jî dibe pêne tayife bi navên: "Memekan, Dûdkan (dibe ku ji Tîtkan yen Qoçanê bin), Mendolkan, Şöxkan, Sarman (piraniya wan li Tirkiyê dijîn). Xelîkanî şeş tayife bi navên: Keçelan, Golikan, Omûyî, Moroyî, Qordiyî, Xozûyî ne. Her wisa di wê meqalê de hatiye gotin ku serokatiya êlê di nav Milan de ji bav digihîje kur, lê belê eger serokê êlê heya dema dawiyê ya serokatiya xwe de ti kurên gehiştî (balix) tunebin, rêberiya êlê dikeve deste yek ji mêrên herî hêja û jêhatî yê malbatê. Milaniyên Xoyê Şafiî ne (lê Milanê Xorasanê

û her wisa piraniya Kurdên Xorasanê Şîa yen dozdeh Îmamî ne). Koçberî û xwedî kirina pez du meh ji biharê bihorîn beşek mezin yê xwedî pez yen êla Milan jî gundên Qişlaqî (germiyan) yen qiraxa başûre çemê Arase û deverên Xoy, Maku û Şapûre tevî pez û lawiran siwar û peya ber bi zozanan ve birê dikevin. Bi destpêka havînê digîhîjin cîhên xwe, bi kêf û xweşiya xilasiya ji zehmetiyên rê û bi dîtina mêrg û di konên xwe yên reş de dimên. Sê mehê tijî li wêderê pezên xwe diçêrînin û di rojên dawiyê yên havînê de dizivirine qişlaqê. Êla Milan ku qiraxa çemê Arasê de rûdinên ev çend salên ku jiyana sivantivê ya bi wateya koçberî û bi tenê pez xwedî kirin berdane, ber bi bazar, sûkan ve diçin, pere û qîmeta pere ya rastî jî hîn bûne û ew naskirine. Lê beşek ji Keçelaniyên Esferayinê têkilê êla Milan bûne û hinek jî di nav Keçelaniyên Qoçanê li gundê Cefer Abadê de ne, berê li Mêrdînê li Kurdistana Tirkiyê jiyane. Nivîskarê Diyarbekirî wan bi navê Ak-keçî û Qere- keçîtî bi nav dike ku li Mêrdîn nêzîkê Siwerekê û ê li wilayeta wê dema Amed de jiyane. Emîn Zekî dibêje "Keçel 1.000 malbat in, nêzîkî Palûyê dijîn. Deh Xoda dibêje ku "Keçeran gundekî ji rêzegundên navendî yê herêma bajarê Bocnûrdê deşt e û av û hewaya wê xweşe, nufusa wê 1124 kes in.

Wêran:

Wêran êleke nivkoçber e, ji berku piraniya wan li gundên û

Xêrabad, Îbrahîmabad, deverên Radkan û Çinaran malê xwe hene û hejmarek pir hindik hene ku mala wan li pi§tê bê û koçer bin. Zêdeyî nîvê hezar malbatan wêraniyan di konan de dijîn û havînan li rêze çiyayên Bînalûd li çiyayen Klîde û Exlûmed dibin. Di dema payîzê de li qiraxa çemê Keşfrudâ ji rojhelat berbi roj ava ve koçdikin û wek Topkaniyan demekê li deşta Keşferûdö li nav darên dewara polê Mozdûran û Rebat Mahî (Rebat Çahek) ku 95 km dûrî Meşhede ye dadikevin û konên xwe vedigirin û bi destpêka çile ber bi Serexsê ve diçin. P£ş û li sorûberên

Şorlûk (Sarloq ji ber ku ava wê şor bûye û di dema êrişa Hisamoselterê bo ser Ozbekên talanker be aliyê dinyê Serexsê hêzên irane ji ber ku pir tî bûn ew av vexwarin û gelek pê mirin. Ew nav bi tirkmanî ye - (berê navê wê Telx Ab bû) heya Gonbedli (gonbedli ku duratiya wê heya

Serexsê 45 km û heya Meşhede jî 150 km ye cîhe Erebên xwezayî ye ku niha bi fartsî diaxifin.) û nêzîkê Xangiranê belav bûne. Rêya ku ev êla dide ber xwe li gor koçberên herêma rojava rêyek kin e û ji destpêkê heya dawiyê zêdetir ji 200 km nabuhute. Wêraniyan ti heştire xwe tunin. Weraniyan 140 kerî pezên xwe hene.

Hîzolan:

Ela Hîzolan li Qoçan û deverên wê belav û bi cîh bûne û hinek jî hê koçber in. Çend malbatên wan di zivistanê de tevî Wêraniyan ber bi Serexsê ve diçin, le yen din li herêma rojava hatin û çûne dikin û di zivistanê de jî ber bi Meravê Tepê ve diçin. Li Taqera Biçûk bin Narliyê cîh digirin û di havînan de jî ber bi çiyayê bakûre rojavayê Qoçanê ve diçin. Yek ji kesên binav û deng yen Hîzolan Xwedê lê xweşbûyî Xoda dad (Xodê da) Kuhistanî ye, ku yek ji dewlemend û xwedî hêz û mezinên Qoçanê dihat naskirin.

Hîwedan:

Hîwedan an jî Hiyedan dibe ku ji "Hîwedil" bin. Lo jî tê wateya cîh bûn. "Hîwedil" cîheke li Cizîrê ku Bedlîsî di Şerefname de wan wekî Kurdên Ezîdî bi nav dike. Ji ber ku gelek rê û remên ola Zerdeştî di çanda xwe de xwedî dikin û dibêjin wana Ezîdî ne. Lê misilmanên radikal jî, ji bo biçûk xistina wan dibêjin Yêzîdî û wan bi Yezîdê kure Mûaviye ku mirovek gelek ne başe û mirovekî zalime ve girêdidin. Mirov dikare bêje ku Kurdên Hîw'edan gişt nişteçîh bûne li Qoçan û Duxaî û li gundên deverê belav bûne. Hebibollah Xan Naşir leşker yek ji emîrên dawî yê Hîwedan bû. Ji

mêrên bi nav û bangên Hîwedan divê em qala Emîr Qolîxan Serkeng bikin ku di dema Emîr Hesen Xan Şocaoddole û kurê wî Mohemmed Nasir Xan Şocaoddole xwedî hêdbareke berbiçav bûye.

E. Xemgîn dibêje: Begê begliga Silêmanî li Qulp, Ciska, Taş, Hasolî û Farqînê kelehê heynan û serokê xwe yê yekemîn jî Silêman bû. Paşe kalên Bidiyan, Karûkan, Dilkelokiya, Ribat, Cirîs, Idnîk û Gêncê jî heynan. Li wê herêmê êlên Hevêdî, Dilweran, Bociyan, Zîlan, Besyan, Zikziyan û Berazan birêve dibirin. Di dema Sefawiyan de têkiliyên wan baş bûn û mîritî berdewam dikir. Di sala 1514 an bi şûn de, di dema Osmaniyan de jî her hebû. (ini l90) Di wan salan de hîna jî Hevêdî li dora Amedê bûne ku gor dîtina min Hîwedan jî Hevêdî ne.

Pirsgirêk û astengiyên êlên Kurmancên Zefaran di karê pezxwedîkirinê de:

Wek nivîskarê pirtûka "Metle û Şems" dibêje hejmara êlên Kurmancên li Xorasanê pir in û nayên hejmartin û ji hejmara stêrkan jî zêdetir e. Ji xwe wilayeta Xorasanê ya berfireh wilayeteka eşîretî ye. F.lên cor be cor yen Kurd, Tirk, Belûc, Ereb, Tirkmen, Xezarê Cemşîdî, Berberî(Moxohş) û her wiha Qereyî ku beşek ji êla Qeşqaiyane û yen wek Tat û Tacik jî li wêderê dijîn. Ji

ber ku nivîskar li ser êlên dirv nexwedî agahdariyên berfireh e, loma nikare ser wan gelek tiştan binîvîsîne. Bes dikare bêje ku Erebên Şebanî, Xerizme Xezaî Mîşmest, Zengûî û Behlûlkuli bakûrê Xorasanê anku li deverên Firdos, Tebes, Qayinat, Bircend û Serexsê dijîn bi zimanê farisî diaxifin (Ev Erebana di dema Xelîte sisiyan, yan jî Osman de hatine Xorasanê. Pîremêrê wan car caran bi erebî diaxifin, le zarokên wan tev bi farisî diaxifin). Tirkên Beyan (di dema Sefawiyan û Efşariyan de hatine Nîşabûre) piraniya xwe li Nîşabûre ne. Tirkên mihacir li Deregez, Şîrvan, Qoçan û Bocnûrdê belav bûne. Hinek ji Tirkmenên li devara Zûrabada

Torbetê Cam û du-sê malbatên li Serexsê û hinek jî li geliyê Cergolan û li bakûrê rojavayê Bocnûrdê dijîn û bi Gugolan û Nixur têne naskirin. Yemutî jî li dor û berên Gonbedê Qabûs Bexayirî û Gerayilî ku ji nesla Moxolan in li Bam û Bakûrê Sebzêvarê bi cîh bûne. Berberi ku ew jî ji Moxolan in li devera Xaf û Baxerz û Ferîmanê dijîn. Divê were gotin ku Tirkên mihacir piştî şoreşa Rûsya koçî Iranê kirin û her wiha divê bê gotin ku çiqên ji Moxolan di dema ûrîşa Cengîz ya sala 616 an de û piştî wê hatine Xorasanê.

Pez

Günden Kurdan yen li Deregez:

Gundên ku mamoste nivisîne gelek in, lê min yên ku me zêde eleqadar dikin nivîsandin:

Xelan yan jî Xelkan: Cîhê jiyana Kurdên Xelkanî ku nêzîkî 50 malbat in û nêzîkê Noxendanê ne. Gundekî Xelika yê 20 km nêzîkî Qoçanê jî heye ku navê xwe Xelikan e; min ew ziyaret kirin û bi apê Hecî Elî Esyer Xanî (80 salî bû- 2003) re li ser dîroka wan deng kir.

Zîndîn: Nêzîkî 180 malbat in û ji Kurdên Sêvikan in.

Şemsîxan: Nêzîkî 150 malbat in û hinek ji Kurdên Kîkan û hinek jî ji Kurdên Mamiyan in.

Şexkan: Cîhê jiyana Kürden Şexkan, nêzîkî Drunger e.

Sêxwan: Du gundên biçûk in ku nifusa wan nêzîkî 60 malbatî ye û li binê çiyavê Koçerê ye. (Gundên Şexwan û Şexkan li herêma Qoçan û Çinaran e û Kürden Şexkan in). Merdox dibêje, ku Şexekan ê ji êla Cibranî ne ku li Bakûrê Kurdistanê navbeyna Bedlîs û Mûsê de dijîn.

Madan: Gundekî li qiraxa çemê Derunger nêzîkê geliyê Eli Bulaxê ku 60 malbat e û di nav wan de ya herî bi nav û deng Hecî Qilicxan e.

Welatê Eşkaniyan Qoçan (Xebûşan):

Xebûşan bajarê mêrxas û egîdan e, cîhê gotinê ye ku em dîroka wî ba-jarê bid in ber çavên xwendevanan. Bi gotina piraniya dîrokzanan û dîrok di- nivîsî Qoçana nû cîhê miletê Parta ye ku bi navê Eşkanî yan jî Pehlewî bi nav

û deng e.

Qoçan

Bi gotina dîrokzanên Îranî Mişirildulû Pîrniya, Ustad Pûrdavûd 0 yen mayin dibêjin; ku peyva Pehlew yan pehlewî van Pehlewan ji Per tu yan Part yan jî Paris hatiye wergirtin. Eşkanî mirovên mêrxas, pehlewan û egîd bûn. Miletê Part yan jî Paris welatê xwe ji bin hikmê Romiyên kewnar anî der ti caran jî nedan destê biyaniyan. Ji ber wê yekê, ew milet bi nav û deng bûn. Gelo çima ji wan re dibêjin Eşkanî, lê navê wan Ereşik bû. (192 47) Hinek dîtin hene ku dibêjin; Eşkanî di esas de Aşkanî ye, yanê kesên xwedî aşan. Lê niqta

pismamê min tîne hole Ereşik hîn rastir e; wek peyv, ew tê wata kesen reş-ik; hîna jî li navenda Anadolê em wê peyvê hi kar tinin. Di beşa Medan de jî min nivîsî bû ku ji mîlîsên Medan re Reşan dihate gotin. Di heman demê, 674-673 an de jî gelekî bi navê Reşan hebû, gelekî bi çek bû, alîkarî dida serhildana Medan. Bi dîtina min di navbera vvan, Aşxanî û Reşiyan de têkiliyek heye. Eşkanî di sala 256 BM heyanî 224 an PM Şahûn îranê bûn. Yanê 500 sali hikmê wan domiya. Di dawiya 224 an de bi desten Erdeşîr Babekan ew hikumet û Şahen Şahı têk çûn û dawi li hukma wan hat. Zanyarên dîrokê piranî dibêjin ku welatê Eşkaniya Xorasan bû û pêda

diçin û dibêjin, Eşk yan Ereşk cihêkî bi navê Asak yan Aşak yan Asaek jiyana xwe domandine û li wir jiyane. Navê Qoçana nû (Xebûşan) di dema berê de Aşak yan Ariska bûye ku navê kalê Eşkaniyan li wir çêbûye.

Di beşa Arî-Aryan-Arran de jî min gotibû û gelek mînak li ser navên cografîk ên bi Ar-agir re tekîldar nivîsandibûn. Navê Qoçanî yê kevn jî balkâşe û xuyayê ku ji alî heman çandê ve hatiye dayîn. Ji vir ev encam dikare derkeve ku xwediyê vî bajarê kevn yan jî yên berî zayînê jî Kurd in.

Dîroka Qoçan di dema Sasaniyan de tevlîhev e, ne diyar e. Di dema Eşkaniyan de ku leşker şandibûn her derê, ji çiyayên Himalaya heya Dicle û Ferat; li bakûr, ji Mazenderan heya çemê Aras û Ceyhan û li başûr heta Xelîca Faris bû. Li wê leşker şandina wan kêmasiya mirovan çêbû û welat vala ma kesek têde nema.

Erdeşêrê Sasanî ku pir kerb û kîn beranber Eşkaniyan di dil de hebû, bajarê Eşkanî bi tevayî kawil û wêran kir, tiştik ji şûna vana nehîştin. Yezd-gurdê Sasanî di navbera Meşhed û Qoçanê de hate kuştin lê wê demê bajarek bi navê Qoçan yan Xebuşan hê çênebû bû. (192j,8)

Di destpêka Islamê de navê Qoçan Esto, Estova, Xocan û Xebûşan ha¬tiye gotin. Lê ya eşkere ew e, ku İslamiyet di sala 31/32 koçî de di dema Xelîfê Islamê Osman de ew herêm û bajar girtine destên xwe.

ŞADIYEN XORASANÊ

Qereçor û tayifên girêdayî wan, êlên Şadî û Qereçor ku li bajarê Bocnûrdê dijîn her yek ji wan gelek şax û tîrên xwe cûr bi cûr hene. Ji hev cûdakirina wan karek hêsan nîne, êla Qereçor ji êla Şadî biçûktir e. Lê belê êla Qereçorî ji her êlên din yên Xorasanê mêrxastir û zîrektir û jêhatîtir e. Ela Qereçorî piştî ku Nadir Şah hate ser kar têkiliyên xwe li gel Zeferaniyan birîn û zêdetir nêzîkê êla Şadiyan bûn û bi zewacan Emîrên her du êlan roj bi roj têkiliyên xwe xurttir bûn. Mezinên wan du êlan jî, wek

Zeferaniyan û hemû Kurdên din hostê şûr in û nebûne xwedî zaniyarî, qelem û kaxizê. Ew cihê ku mêjiye xwe bikar bînin heza milê xwe bikar dianîn. Lewra jî ti dîrok û sened û belge ji xwe bi cih nehîştine. Lewra karê lêkolînê bo min pir zehmet bûye û pêwîste bêjim ku ji bilî wî nivîskarî ti kes nikare wî karî bike. Çend caran ez çûme herêma

Bocnurde u hemu gundên heremê geriyam lê mixabin ji ber ku vê daviyê

hiseka xirab u be hedbarı di nav gel de zede bûye ti kesan nediwen ku hest u

ramanen xwe ji me re beje. Piremer u mezinen wan ên xwedî agahiyen êlê jı,

ew çend sal in ji nav çune. Hinek sened u belgeyên dema Safewî û Nadir de

nav tayifen Kurmanc de hene le mixabin ti kesi newêrî wan nişan bide. Lewra

jı kare lekoline dijwartir dibe. Lê nivıskar ji ti tiştan natirsin û baweriya wi bi

nifşa ciwan heye û heviya wi rewşenbıren Kurmanc in ku dixwazin heysiyet,

nasname, kesavetiva xwe va dîrokı, çandı, hunera bav u kalên xwe vên li wi

mekanı bıparezın u ew pırsgireke bi nışandana qebile u hukim u belgeyen

zikate we be çareser kirin.

i.

S

Muza Şadıyan ya li Bojnurde

Ji têkîliyên din ku êlên Şadı û Qereçor nêzîkî hev dike, du tiştûn girîng û bingehîn e, ku yek ji wan ew e; ku her du jî li başûre Qefqasya cem hev bûn. Ya duduyan jî, her du êlan jî pir ji zimanê tirkî hez kirine û wisa lê hatiye ku zi- manê kurdî di bi kar anînê de wek zimanê duduyan e. Lê di cil û bergên kurdî û çand û rê û risimên Kurmancî de jî Zeferaniyan pêştir bûne. Bilî ji Hindê ew du elêna li herêma Bocnûrd de bi cîh bûne hinek êlên Zeferanî yên wek Kîkan, Hemzekan, Bêrîvan û Barzan jî li herêmê bicîh bûne...

Piraniya agahdariyên ser êla me ji seferên Nasireddin Şahö li ser Xorasanê bi dest xistin. Nasireddîn Şah di salên 1284 (1866) û 1300 (1882) de du caran çûbû Xorasanê û ji ber ku wî Şahî elaqayek zêde bo dîrok, çand, edebiyat, bi taybetî jî ji folklara gelerî hebû û mirov dikare bêje ku xisaret û zerara malî ku ji wan seferên Şah digihîşte êlên herêmê bi tene ew yeke jê baş bûye ku hinek tişt ji aliyên Senîoddolê û yên din an jî Şêxsê Şah ji bo me ronî kirin. Her çiqas jî dîrokzan dibêjin ku ketina leşkeren Şah bo her herêmekê wek ûrîşa kuliyan bûye (Her tişten ser rêya xwe talan dikirin û diçûn).

Nasireddin Şah di Sefernama sala 1300 (1882) an xwe de bo Xorasanê ku ji rêya Bocnûrdê çûye IV^hedê. Dema ku digihîjê gundê Fîrozê û gelên gundîji 250 malbatên Kurdên Şadî dinivîsîne û dibêje ku êlên Şadî ku li ser rê zozanan dikin tayifên Xemperan û Dêran e. Eslê Şadiyan Dêranî ne. Senioddolê ku li gel Nasireddîn Şah bû dibêje, ku nifûsa gundê Fîrozê zêdetir ji 200 malbatan û dibêje: "Gelek gundên Kurdên Şadî ne ku bi zimanê tirkî diaxifin."

Her wiha dinivîsîne ku: " Li gundê Çarbendê 40 malbat ji Kurdên Şaır^ hene." Mirov dikare êla Şadiyan wek Bedran, Qolîçan, Qapran, Alan, Gerîvan, Capan bihejmêre û hinek din ji tayifên Şadî di dema Axa Mohammed Xanê Qaçar de ji bo parastina ewlekariya rêyan û kolanên

nêzîkî Tahranê birine Demavend, wekî Nadir Şah, Emarî ji Qoçanê biribûne Gîlanê. Senîoddolê dibêje ku: Gundê Cabanê (li Demaven) ku rêya (Tehran bo Xorasanê) di navê re derbas dibe. 200 malbat in û gelê wê jî ji Kurdên Şadî ne. Kurdên Şadî ku li wêderê dijîn di dema Şah Şehîd Seîd Axa Mohammed Şah Tab Serah de hatine wêderê. An ku di sala 1210 (1792) an de bi destûra Şah Rizvan ew ji Bocnûrdê Cabanê ketiye geliyekê de ku çendsed metre yeka wêdayî Cabanê Gundê Serbendan heye ku 80 malbatên wan Kurdên Şadî ne ku ji Bocnûrdê koç kirine vira. Bi destûra Şah Şehîd (Axa Mohammed Xan) baxçeyek hate çêkirin û navê wê jî danîn Baxşah.. Ji ber ku hêdî hêdî ew baxçe xirap bûbû çend salan berê niha (Ku îsal 1300-1882) ye bi destûra Nasireddîn Şah ew carek din ji nû ve çêkirin û carek din ji nû ve dar lê çandin û niha jî gelek dar û şînahiyek xweş heye. "Tiştân ku nivîskar guh lêbûye ev e ku tayifek bi navê Gawestiyan, anku kesên ku di dema koç kirina mezin ya Kurdên Mahabad û Ezerbeycanê bo Xorasanê ga û çêlekên wan li Demavêndê westiyan û nekarîn ber bi Xorasanê ve biçin û li wêderê man û li Demavendê bi cîh bûn. Hêja Qolam Hasên Rehîmiyan ku ji çand û dîroka Kurdan pir hez dike, li ser Kurdên Demavendê ku ji nêz ve bi wan re axifiye û dibêje:" Kurdên Şadî ku li Çapana Demavêndê

dijîn, di dema Mozeffereddîn Şah de serî hildan û şoreşa wan mezin bû û bû sedem heya ku Şah neçar ma wezîrê xwe yê mezin hem ji bo lêkolîn û hem jî ji bo razî kirina wan şande Demavendê.

Dr Mesûd Kayhan dibêje êlên Şadı di sala 1932 an de 18.300 xane bun; Henri Fîld jî dibêje di sala 1938 an de 80 hezar kes bûn. Kayhan, êlên Şadı vviha rêz dike:

1. Boxî (Şerî, Hecîkî, Hüseynî, Mişî)
2. Alanı

3. Bedrî
4. Qaçkî
5. Qerebaş
6. Kopirî
7. Qeçerî
8. Meterî
9. Hemzikî
10. Çekmaxî
11. Qereçorî (36 ber in)
12. Sirî
13. Dirî
14. Îzanî
15. Qiliçî
16. Dirîqanî
17. Înranî
18. Gordanî
19. Cûyanî
20. Girîvanî
21. Capanî
22. Kaqanî
23. Xinzor

Hinek ji Şadiyan jî li Kelardeşte hatine bi cîh kirin, beşek ji Kürden Kelardeşte ji êla Xacêvend yen Kirmanşahe ne. Kürden Heskîfê jî li navenda Kelardeşte ne. Gundên Demavend yen ku Kurd lê dijîn wiha ne:

Ecevît, Meka, Rûdbarek Mecel, Kurd Mehele, Toy Dere, Meka Rûd, Lahû Feşeh, Kurdî Çal û çend gundên din in.

Caban:

Ihtîmalek mezine ku eslê wê "Capan" be ku ew jî navê serdarekî Kurdên Iranê bûye. Di dema şere dijî Ereban peş bûyera Qadîsiyê. Kurdên Capanî yen Bocnûrd û Demevendê dibêjin ku esil û neseba me digehîje wî serdarê Kurd (Capan). Hêja Mohemmed Cabanî ku bi xwe jî xwedî agahî ye û di karê lêkolînê de ye dibêje ku : "Bav û kalên me ji Kurdên Caban yên nişteclhen Demavendê ne ku li wêderê hatine Qoçanê û tevî êl û eşîra xwe an ku Zeferan

bûne û eslê me digehîje Caban ê ku serdereke Irani bûye di serê li gel Ereban de."

Nivîskar ku digot: "Caban" dibe ku ji "Cavan" û "Cafan" ji êla mezin ya Caf a bin. Lê beiê heja Çabanı wê yekê red dike. Ez jî neçar mam ku di warê Caban de hinek lêkolîna bikim û ez gihîştime wêdeiê ku: Caban yek ji serdarên bi nav û deng yen Iranê ye ku di dema Erdeşîre III an yê Sasani de li gel Behmen Cadûyê serleşkere Iranı bû serdarê Iraniyan bû di şeren Alîs û Nemarêq ku pişti heyva seferê sala 14 ên Qemerî (596) zayinî de rû da. Kurdên Caban dibêjin ku me ji bav û kalê xwe bihîstiye ku ew Caban Kurd bûye û em ji ji neslê wî ne û ji tayifa wî ne.

Kurdên Şadî Girîngtirîn Parêzerên Tixubên îranê ne

Kurdên Şadı li Ezerbeycan, Qerebax, herêmên başûre Qefqasya yek jî girîngtirin parêzerên tixubê Iranê yê li hember dagirkerên biyanî bi taybet Tirkên Osmanî bûne. Li Xorasanê jî yek ji girîngtirîn parêzerên tixubên bakûrê Iranê bûne li hember dagirkerên biyanî. Herêma hikumeta Kurdên Şadî bi sînor bûye û li bakûr bo Xarezmê û li başûr bo Şahrûd û

Çola Xorasanê. Li rojhilat Esferayin û Şîrvam (Cîhê Qere Xanê Bendî û Tunela niha ya rê ya mezin ya Asya) û li rojavayê Esterabadê.

Emîrên Kurdên Şadî ku navê wan di dilê dîrokê de hatiye nivîsîn wiha ne: Qûrçî Yûsûf: Cedê Emîrê Kurdên Şadî yên Xorasanê ye, ku piştî Şah Elî Siltan (Şah Qolî Siltan) emîrê êla mezin ya Çemiçgezekê bû hakimê eseh yên Kurdên Xorasanê û evv yeka bi destura Şah Ebbasê yekan di sala 1037 ên Qemerî (1619) de pêk hat. Çawa Siltan Emîtê êla Çemişgezek Kurde û hakimê "Xebûşane ye" û her ew Yûsûf Siltan jî Qûrcî Yûsûf bû ku erîş bire ser Ebdolmimin xanê Ozbek û gelek mêrxasî û fedakarî ji xwe nişan dan û ji meqamê "Qûrcî" yê hate meqamê "Siltanî" yê.

Necef Elî Beg: Elî Beg kurê Qûrçî Yûsûf bû ku piştî bavê xwe bû serokê êla Şadî.

Emîr Gûnê: Kurê Necef Elî Beg e.

Tolî Xan: Kurê Emîr Gune Beg, her ew kese ku bajarê Bocnûrdê ji bo biranîna kela Bicengird a qedîm ku li devera Çoqûr-Şad a Azabeycanê ye, damezirand û çêkir.

Cefer Qolî Beg: Kurê Tolîxanê (Dulî Xan).

Necef Elî: Kurê Cefer Qolî Beg e ku hinek dîrokzan bi şaşî dibêjine Necef Qolî û ew bi fermana Şah Tehmasb li Qoçanê hate kuştin.

İbrahim Beg: Kurê Necef Elî Beg Cefer Qolî Xan e, ku di şere dijî Nadir li Qoçanê hate kuştin.

Necef Elî Xan: Kurê Cefer Qolî Xan e.

Tolî Xan: Kurê Necef Elî Xan e (di dema Şah Rox Nadirî de Emîr Elî Xan veşart).

Ibrâhîm Xan: Kurê Tolî Xan e ku bû hedefa erîşa Axa Mohammed Xanê Qaçar û li Esferayînê hate sekinandin.

Xanê Şadiyan yen li Neynikxanê -Bijnûrd

Necef Elî Xan (Necef Qolî Xan): Necef Elî Xan ÎIxanî donzdeh kurên mêrxas û reşîd hebûn ku navê hinek kesan ji wan wiha ye: Cefer Qolî Xan, Heyder Qolî Xan, Qehar Qolî Xan, Elî Merdan Xan, Mohammed Rehîm Xan, Azad Xan, Sobhan Qalî Xan, Yezdan Qolî Xan, Mohammed Qolî Xan, Şîr Mohammed Xan. Kurê Îbrahîm Xan e ku Feth Elî Şahe Qaçar jê re zêdenav digotê ÎIxanî.

Cefer Qolî Xanê ÎIxanî (Sehamoddolê): Kurê yezdan Qolî Xan e

A

û biraziyê Cefer Qolî Xan û Heyder Qolî Xan e. Heyder Qolî Xanê Ilxam (Sehameddolè) birayê Cefer Qolî Xanê Serî ye. Yar Mohammed Xanê Ilxanî (Sehameddolè) Kurê Yezdan Qolî Xan e û biraziyê Cefer Qolî Xan û Heyder Qolî Xan e.

Ezîzollah Xan: Serdarê mezin ê Bocnûrdê kurê Yar Mohammed Xanê ku bi fermana Riza Şah hate darde kirin. Senîoddole di pirtûka Metleoşems de li jêr navê "Esi û neseba Ilxaniyan û Emîrê Bocnûrdên" de dibêje: "Cedê wan yê mezin Qûrçî Yûsuf bûye ku bi fermana Şah Ebbas bû hakimê Kurdên Şadî. Faş wî kurê wî Necef Elî Beg cîhê bavê xwe girt û dû wî re jî kurê wî Emîrgune Beg piştre jî Tolîxan kurê Emîrgene Begê bû hakim. Her wisa piştî wî jî Cefer Qolî Xan kurê Tolîxan Pa|ê Necef Elî Beg kurê Cefer Qolî Beg û dûra jî Ibrâhîm Beg kurê Necef Elî Beg e (di şerê li dijî Nadir ser zewaca gel keça Sam Begê Zeferanî de li Qoçanê hate kuştin) dûra jî Necef Elî Xan kurê Cefer Qolî Xan,

piştre Tolî Xan kurê Necef Elî Xanê Ilxanî kurê Ibrâhîm Xan e ku Dû wî

re jî Cefer Qolî Xan kurê wî ew paşnave li gel hakimiya Bocnûrdê wergirt û Şaf^ Şahan Nasireddîn Şah dereca Mîrpencê (serle§keriyê) dayê. Di vê demê de hukumeta Esterabad û Bocnûrdê yek bû. Piştî Cefer Qolî Xan, Heyder Qolî Xanê Semoddolê kurê Necef Elî Xan, bû hakim. Heyder Qolî Xan û Cefer Qolî Xan û Yezdan Qolî Xan bira bûn, piştî Heyder Qolî Xanê Yar Mohammed Xan Sehamocidolê kurê Yezdan Qolî Xan bû hakimê demê yê Bocnûrdê ku gelek mirovekî xoş reftar û baş bû û cîhê mamê xwe girt. Ev xanên han giştik di dema xwe de bi mêrxasî û fedekarî û mezinahiya xwe hatine naskirin û gelek xizmetên ber bi çav ji bo dewleta her dem zindî kirin.

Li bajarê Bocnûrdê, ji Şadiyan gelek îmaret mane; ji wana yên bi nav û deng: Neynik Xan, Bimaristana Şadiyan û Goristanên Şadiyan in. Bi taybetî Xan gelek ba^şe û wekî qesreke ji bo xan û mîran hatiye avakirin. Di nava wê de ku niha bûye muze, gelek amûr, dest nivîs, belge, cil û wêneyên xanên Şadiyan hene. Ji derve ew bi çîniyan hatiye çêkirin ku di alî pâşî de gelek sembolên Şadiyan yên watedar hene. Di nava wê qesiê de odeyeka taybet heye ku her dera wê bi neynikan hatiye çêkirin. Ji bo mêvan û diplomatan ew ode bikar dianîne. Her xanekî Şadiyan jî wênên xwe li dîwaran e... Li baxçê wê heykelekî ji Xan yan jî şervanên Şadiyan mayî heye ku rûyên wî yê direj bi rengê sor hatiye boyax kirin. Mirovekî pir bi heybete ku mirov dema lê mêzedike xofê dide ser mirovan. Sedema rengê sor min pirsiyar kir û gotin: Dema şerva^n Şadî diçûne şer rûyên xwe bi sor boyax dikirine, ku dema ew birindar dibin ma xwîna wan xuya neke û morala hevalên wan xira nebe, ya dijmin jî xurt nebe...Xuyaye ku komeka pir mêr û egîd bûye. Li alî din jî, gor demê gelek amûrên zireetê û bazirganiyê mina terazî û tizxera cotkariyê/ makîna pê axê lihevdixî heye ku gelek ba^ş in. Di alî sûsa jin û keçan de jî dewlemendî û cûrbûneka pir heye ku ew jî nîşana mîrîtî û şaristaniya wan e. Dîsa

nexweşxaneyeka pir mezin avakirine ku ji her alî ve nexweş lê têne derman kirin..

GÎLAN (Reşt):

Gîlan eyaleteka piraniya nişteciîhe xwe Kurd in û ji her zarava axifên kurdî lê dijîn; bi dîtina min hinek komên di bin sîwana navên din de dijîn jî Kurd in. Eğer ji alî lînguîstîkî ve lêkolînekê kûr bê kirin, bavver dikim hemû kevir ê têkevin cîhê xwe û di nava nijada wan de standartek pêk bê. Wek mînak: Li navenda Anadolê Kurdên bi zaravê Şöxbizinî dipeyivin hene, di esas de navê wanê giştî Ler-Lek û Lor e, lê li herêmê bi navê Şêxbizin têne nasîn. Li cografyayê din jî ne dur e ku heman kom bi navekî din bin. Li ser vî esasî koma bi navê Talîş jî bi dîtina min Kurd in...Lê ew yeka li hêviya lêkolînên kûrtir e.

Herêmêka çiyayî ye; eger mirov wir navend bi gire, çiyayê (Sevalan) wir heta Xorasan û Afganîstanê dirêj dibin, ji alî rojava ve jî heta Erzirûmê dikarin bên. Kurd li başur, rojava û rojhilatê derya Kesk dijîn. Texmîn dikim gelek ji wan heliyane. Gîlan ji bo ku çiyayî ye, cotkarî kêm e, xelk gelek belengaz e, têkiliya xwe bi dinyayê û Kurdên din re nine. Ji bo ku çiya û derya ye gelek şilî/avî û şepelî j! heye. Ji alîkî ve jî gelek erdhej li wir pêk têne û min bi çavên xwe dît ku çiyakî ji nîvî ve hatiye xwarê û hilweçiya ye. Günden li ser wir jî kavil bûne. Piştre ew gundên derûdorên wir li çar navendan kom kirine ku ji wê re "Çar Mihele" tê gotin.

J

Mihemmed Eli Pûr

Ji herêma ku Kurmanc lê dijîn re E/Amarlû tê gotin, ku gund û baja- rokên li dora du çiyan avabûne û li hember hev in. Li wir gund û bajarokên mîna Çorê, Xaskûl, Çilkeser, Reşî, Zîbin, Talûkû, Sûrmil û Çarmihele hene. Li gundê Reşiyan, li ber postexanê jineka genca bi cilên reş û meleseke reş rûniştibû; çavên wê, rûyên wê û didanên wê yen spî mirov bernedida; te nedi- karî li wê binerî... Xwîna mirovan dikeli ser, te digot ew xanga/xwîşka min a 500 sal berê wenda bûye û min niha peyda kiriye! Ew tiştekî ji xwîn û hestan tê, mirov nikare wê hestên wek miqnatisê hevdû dikişine bine ziman. Wê di¬got: "Em Reşî ni" paşö em bûn mêvanê Apê Şaban Mihemmed Eli Pûr (75 sali) ku digot: " Cedê me Reşî-Rehmetava ye" ji gotina wî min ew derxist: Gund wek Reşiyan tê zanîn lê piştre ewî kirine Rehmetava.

Wekî gundên me li Anadolê. Mirov navê kurdî nabîne, lewra ew bi navê êla xwe tên xwendin, lê her êleke îro bûye heri kêm çar-pênc gund, mirov ni¬kare hemûyan bi navê êlêkê bixwîne. Ji bo wê ji navên cûda ku piraniya wan tirkî ne lê danîne. Li wir ji navê farisî lê danîne.

Emarlûyê li Qirşehîrc

Nêzîkî vê herêmê bajarê Mencilî heye ku gundê xwe bi E/Amarlû re dran in. Gor agahiyên gundiyên Kurmanc dayî, hinek ji wan ev in: Pêlangerê Bala, Detraz û Racê ye ku gel digot ew ne Kurmanc in. Raste, ew gereg Ler yan ji Kurdên Goranî axêf bin.

Beri ku tnirov here wê herêmê, gund û bajarên Kurd le dİjîn hene ku hin ji wan li dora bajaiê Qe/wînê ne. Gundên mîna: Bacilan, Spaplî, Çekenî, Celîlwendt Reşwendî, Geyaswendî, Kakawendî, Mafî, Behtûî, Kirmanı, Ye¬meni, Weliyarî, Baharîwendî, Papaî, Pîremerwendî Kelwendî,

Gûderzwendî, Nîzamîwendî, Mîrxanwendî, Paçnarî, Xerkanî, Pîrqulîwendî û Gogir in. Li rojavayê herêma E/Amarlû jî herêma Xalxalê heye ku Kurd nişstecîh in. Dîsa li bakûrê Xalxal berbi sînorên Ezerbeycanê jî koloni yen Kurdan hene, lê em nizanin ka gelo rewşa wan çawa ne.

Dîman: Ela Omeran di sala 1780 an de ji Qerebax û Qeredaxê anîne sînorên Ozbek û Afganiyan. Di Gulogan de rûdinên. Bi vê re girêdayî Faîk Bûlût tişten balkês nivîsandine: "Şah Ebbas reisê Çemişgezekan Şah Elî Xan wek mîrê herêma Xorasan tayîn kir. Bi îhtîmaleka mezin ew komên din hemû bi navê Çemîşgezek binav kir û beşek ji wan Çemîşgezekiyan bi Şah Ebbas re tevlî sefera Afganîstanê bûn. Di sala 1600 an de 40 hezar malbat mecburî koça bakûrê Xorasan (Aşkabat) kirin. Lê Kurdan di wê xakê de bi Ozbekan re şer kirin, zahmet dîtin û şûnda vekişîn çiyayên Guşan (Kuşhan). Li wir Çekeniyên girêdayî Pır Budax Beg bi Çemîşgezek iyen ve hîn zêde tevhev bûn. Şah, ji bo ku Kurdan zayif bixê Yûsûf Siltanê eslê xwe Gurcî wek walî-mîr şand herêmê. Plana ku wî hêvî dikir nebû û êlên Kurd yekîtî û aştî çêkirin. Bi ser vê yekê de êla Şadı li navenda bajarê Bojnûrd û li rojhilat jî li Zaferanî bi cîh bûn. Ji bilî wan gelek êlên din ên serbixwe jî hebûn. Wek mînak Emarî (Nadîr Şah şandibû) û Qereçorî (Tîreka Şadiyan e), lê serbixwebûna wan gelek najot. (36) Dr. Behrewan jî dibêje: Qerê Xan serokê Çemîşgezekiyan bû. 40 hezar ji komên Zefaran, Şadî, Kawan, Emar û ji Qereçoriyan pêk dihat. Zefaran li Bicnûrd, Şadî li Çinaran, Kawan li Xakçilaya li bakûrê Meşhedâ bi cîh kirin. Şah Ebbas piştî şer ew elana ji hev cüda kirin û serokê wan elana bi nemerdî kuştin ku ma ew li dijî wî dernekevin. (197 ,6> Di vî awayî de Osmanî û Sefawiyan heman siyaset dimeşandin. Mümküne ji hev fer bûbun.

Dema Nadîr Şah Hindistan wergirt, Kurd ji bo ku bacê kombikinşandin Nû-Delhî ye ku ew ji êla Hemzikî bûn û serhejmara wan nêzîkî 50 hezarî bû. Hemzikî û Hewêdî Ezîdî bûn.

Şerefname jî, qala êleka bi navê Gil (Kil) dike û Çekenî çawa çûne di-nivîsîne. Va êla bi qehremaniya xwe 1İ rojhilatê Kurdistanê bi nav û deng bû ye. Serokên wan ê mezin tunebûne û bi sêlandina xwe va xelkê meşhûr bûne. Dewletê zexta li ser wan zêde kir û ew jî koçî Hindîstanê kirin. Pasê ketin bin emra waliyê Heratê yê serhildêr, lê Şah Ebbas (1588-1629) serhildan têk bir. Ji muhafizê xwe yekî (Budax Beg) ji Çekeniyan bû ew kire serleşkere herêmê. Bi alîkariya Çekeniyan Ozbek têk birin. Lê gelek muhafizên din bi Şah pêwîst bûn û Çemîşgezekî yen koçber ên nêzîkî Rê anîn li wir bi cîh kir. Elên din Kurdên Qefqesya bûn û dema Osmaniyan di sala 1576 an de Qefqesya dagir kir, ew reviyan Iranê. Di şere Osmanî-Iranê de Ëbbas ew li Gîlanê bi cîh kirin. (36)

BI GIŞTÎ ÊLÊN KURDÊN LI XORASANÊ

Mamoste Tewahûddî êl û zendên Kurdên Xorasanê mîna dareka bi şax û çilo nîşan dide. Ji wan şaxen mezin yek Şadî (Bojnûrd), yek Keyvan û ya din jî Zefaran in (Qoçan). Ya herî mezin û bi şaxdn zêde Zefaran in.

Êl û Zendên Kurdên Xorasanê:

Cegenî, Zengene, Erdelan, Pazûkî, Baban wek §axên biçûk nîşan dide.

I- Şadı (bajarê Bojnûrd): Çexmaxî, Qerebaşî, Boqanî, Bedranî, Qompiranî, Girîvanî, Qopiranî, Alanî, Qaniyanî, Xendeqî, Qereqaşî, Caban, Xadimanî, Kepkanî, Diriyanî, Temam, Diriqanî, Qirêkanî, Nergîsî, Sîranî, Zivvîranî ne.

II- Keyvanî: Mistikanî, Vêranî, Milan, Dêrûsan (Tûrsan), Bêrîvanî, Zengilanî, Lalû, Cafkanî, Xelanî û Zerikanî ne.

III- Zefaranî (Çemîşgezekî):

1. Topkan û Rûtikan.

2. Mojganî, Emarî û Tomaşî

3. Reşî, Tarîxcîû Birzilanî

4. Hevêdî

5. Baçiyanî.

6. Badilî, Xaxiyan, Tîtêkan, Zerdikanî (Bajarê Aşxane), Afşarî, Tûkanî, Xelkan, Qaçkan

7. Hem zekan, Şerman

B. Zîdan

9. Kuxbinîk, Şeran, Kuran, ...

İÜ. izan, Pelîwan

11. Şerkan

12. Şevekan/Sîvikan: Ulaşlû, Buwan, Xukan, Zurtan, Kulîman, Sokran, Bîware, Dûdan, Xêraskan û Geugan in.

13. Kîkan, Zaxûra, Guyan, Tîran, Şam, Bîçeran, Tayan.

14. Siyamensûr, Kasan, Naman, Sîlsupurên, Alxas, Palikan

15. Şexemîran, Qurdan (Bojnûrd).

16. Celali, Qerekan, Kombelakan, Began.

17. Milan, Qulan, Kelmişî, Kesanan

18. Canbeg

19. Kurdikan

20. Qereman, Murdikan, Zîkan, Purtekan, Odikan.

21. Qereçor, Qurçan, Manaîn, Mamêdan, Kêrikan

22. Şexikan in. Bi vî awayî nêzîkî 110 êl tenê li Xorasan û 123 êl jî li herêmê bi giştî hene.

NAV LE DANINA ELEN KURD

Di gelek jêderênTirk û biyanî demirov dibîne ku Osmaniyan êlên Kurdan bi piranî li gorî herêman bi nav kirine. Berî Osmaniyan hê desthilatdariya xwe bi hêz nekirî jî, piraniya êlan bi navê serok û rêberan dihatin binav kirin. Ji bo ku Osmaniyan 1İ ser navê herêmê bi navkirinê û di herêmekê de jî bi sedan êlên Kurdên ji zendên cûda dijînê û ew yeka dibe sedema gelek tevlîheviyan. Di roj û şerten îro de hemû arşîv di destê Tirkan de ne; em nûserên Kurd jî ji wan sûd werdigirin; lê ji bo ku di qeydên dema Osmaniyan de navê êlên Kurd bi zanîstî hatine guhartin û li gor herêman hatine nivîsîn, ji bo me zelal kirina êl û zendan mina bîrê bi derziyê kola nd in e. Li ser vê bingehê emê hewl bidin ku ji binav kirina Tirkan êlên Kurd zelal b ikin. Wek mînak; go tine Tirkmenên Helebê, Boz-Ulûs û hwd. lê di bin sîwana wan navan de bi sedan êl û zendên cûda hene. Ji vê kiryarê jî tê fêhm kirin ku înkara Tirkan ya gelê me çiqas kûr û dirêj e.

î. Şahîn, li ser binavkirina êlên Kurd analîzeke baş kiriye: Di dema Osmaniyan de, êlên koçber bi navê Tirkmen yan jî yoruk dihatin nasîn. Wek grup li cîhên dijîn bi navên mina: Tirkmenên Helebê, Tirkmenên Yenî-Il (carna jî dibêjin Tirkmenên Uskudar=Yaban erî), Boz-Ûlûs, Esb-Keşan, Remezanli

Ûlûsû, Yorukên Dulqadir, Yorukên Enqerê, Kütahya, Bolü, Teke, Yen li

Rûmeliyê jî bi navên mîna: Naldöken, Qeregoz, Selanik, Vize... Navê Tirkmenên Helebê navekî cografîk e; yen mîna Qeremanî, Danişmend û Remezanî jî ji ber nasnama wan a siyasî ye; Yorukên Kelaha Cemele (Kirşehîr) jî ji navê wê qelê ye; ji bo ku Canbegan hespên bi cins xwedî dikirine û baca xwe jî bi hespan didane navê wan Ûlûsê Esb-Keşan hate dayîn. (16fM%) Li başûre Sêwasê, Yenî II, di sala 1548 an wir de ava bû, ku cîhekî pir fireh ji xwe re war girt, nayê zanîn ku navê xwe ji ku wergirtiye. Lê gor texmînê, ji bo ku Atçeken a Eskîlê hîn kevn bû ew navê

Yenî-Nû lê danîn, ew jî kirin Yenî îl.fl68'1Q7) Gor ez texmîn dikim di nava Yenî Ile de êlên: Têrikî û Sewêdî ye hene. Boz, di kurdî de tê wata zer-rengîn; ji bo wê navê zenda Zerikî kirine Boz-Ulûs, yanê zendê Zer. Di nava Boz Ulûsa ku Tirk bi nav dikin de gelek êlên Kurdan hene. Ewa ku min tespît kirine: Têrikî û Zerikî ne; yên din jî yek Şam Tirkrnenî û yek jî Dulqadir e.

Navên êlan, carna ji serokê zenda wan, carna ji keya û carna jî ji rûspiyên êlê dihate wergirtin. Wek mînak: Inaliyên girêdayî Tirkmenên Helebê navê xwe ji serokê xwe yê sala 1520 an Hemze yê kurê Inal girtin. Dîsa di dema Yawûz de, di 1519 an de hejmartina nifûsê hate kirin û di serî de "Mehmed Veledî Hecî Orner" hatiye nivîsîn ku ev êl navê xwe ji Hecî Orner nivîsiye. Di deftera 181 an de em rastê navên mîna Mendol, Mansûr û Celikan hatin. Dîsa li gelek deveran navê Şah jî heye,(17MI) V. Hecî Orner wekî em dizanin îro li navenda Anadolê wek Omerî tên nasîn. Mansûr jî şaxekî Reşiyan e û li Semsûrê dijîn. Celikan jî mümkün e navê xwe ji Celai girtibin. Li ser vî bingehî, niha jî em êlên di nava wan zendana de ji nêzîk ve analîz bikin.

CELALİ

Bi dîtina birêz îzady, cara yekemin, di destpêka qirna navîn de qala Ceialiyan tê kirin; wê demê li başûre Zaxrosan û li Farsê navê wan derbas dibe. Ji wê qirnê ve ew berbi bakûrê rojava belavbûne û di roja îro de ew li (Gelû yan jî Kuh Gilûya) başûre Zaxrosan; wek Galawand, Kalalawand, Celalawand li Zaxrosa Navîn; wek Celalî jî li bakûrê Zaxrosan hene. Berê jî şaxekî din 300 sal BI, ji heman herêmê Gelûlan û Dilaman/Deyleman jî çûn keviya Derya Kesk (rojavayê Elbrûz) û navê Gîlan jî ji wir tê. Piştî sedsalakê ji bakûrê Dicle jî xis- mên Dilaman hatin herêmê û ew yeka heta sedsala IV an PÎ domkir. (154 183)Wekî gelek çavkanî didin xuyakirin û encama ji wan derdikeve ku Celalî demeke gelek dirêj di navbera Şehrîzor

Gîlan û Arran de diçûne zozan û germiyan. Ji bo ku li başûr bi Ereban re şer dikirin û di şer de gelek serkeftîbûn, Ereban navê Celalî li wan danîne. Wata vê kesen şervan yan jî ji şer hezdikin bû. Di esas de navê wan ne Celalî ye. Gelek êl û federasyonên êlên Kurden di bin sî- vvana vî navî de hene. Mirov dikare bibêje ku Şadî, Badilî, Reşî, Kîkî û gelek êl û komên din di bin sîwana vî navî de hene. Dema zivistanan dadiketin başûr, navenda wan Zehrîzor bû. Li wir bi Ereban re diketin têkiliyên şer, lewra ji bo wan Şehrîzor herêmeka stratejik e û ji bo ewlekariya xwe heta dema dawî dev ji wir bernedan. Bi taybet di derdora salên 876/77 an de dora Şehrîzor kirin qada gelek şeran. Gor Poladyan dinivîse; serokê Xariciyan Şarî mir bi şûnde, Xarîcî çûn cem Muhemmed îbn Hurzade yê Kurd, ku li Şehrîzor bû û jê xwestin ku ew hibe serokê wan. Wî li destpêkê nexwest bibe, paşe Harûn Al Bagyalî Aş Şarî bû rêber. Piştî ew pêk hat jî Hurzade xwest bibe serok û ev yeka di navbera Xariciyan de bû sedema şer. Ibnî Haldûn dibêje: "Hurzad bi Harûn ve li Mûsil gihîştin ber hev. Lê nistecîhên bajêr aliyê Harûn girtin û Hurzad bi hinek Kurdan ve bi serê xwe ma. Harûn erîşî wan kir, Hurzad mir û Kurdên al-Celaliya jî belav kirin. Bi vî awayî Hurzad heta Mûsil çû lê îxam eta alîgirên wî bû sebeb ku ew têk here. (3‘56) Ew teklîfa ji kûdret û muxalîfbûna wan a li hember misilmanan tê. Berî wê demê, artêşa Ereban di dema Xelîfe Orner de (643) erîşî ser Şehrîzor kiribû û têk çûbû. Piştî vê artêşa duyemîn jî di serokatiya Utbe bin Farkad de çû û Kurd teslîm bûn. (19‘59) Di wî şerî de teslîm bûn tê gotin, lê bi dîtina min wê demê lihevhatinek heye, eger ne wiha be, di demeka kin de ew teklîf ji serokê Kurd re nedikirin. Piştî ew şer û têkçûyîna Kurdên li dervayê welat ku wek Celalî têne binavkirin hîn bêtir berbi bakûr hilkişiyan. Ew yeka dê paşd rê li ber avabûna dewleta Şadî veke...

Li ser vê babetê îzady dibêje: Piştî sedsala IV an (PÎ) heta sedsala XI an Deylemîn ewqas pir bûn, ku cîhên din ê Elbrûz jî dagirkirin û berbi xaka

îslamê ya li rojhilat jî belavbûn. Rewandî jî, li bakûrê Xorasan bi tevahî bi cîh bûbûn. Ji wê deme vir ve, ji wê herêmê re dibêjin "Girên Rewand". (!54'1H4) Bi dîtina min di nava Deylemiyên ji ber Ereban rêviyabûn çiyayên Elbrûz de êlên Goran, Hewraman û Lêr-Lek jî hebûn. Li herêma Şehrîzor hîna jî navê Celali-

yan li ser herêmên cografîk û li ser êlên Kurd heye.

Mesûdî (893-965) di berhema xwe ya bi navê "El-Tembîh" de 16 êlên Kurdên bingehîn dijmêre û coğrafya Kurd lê dijîn wiha rêz dike: Fars, Kirman, Sîstan, Esfehan, Xorasan, Cibal (Zagrosên navîn û bakûr), Hamadan, Ermenistan, Iran, Loristan, Ezerbeycan, Anatoliya Navîn, Sûriye, Antakya, Edene. (154',8<') Li Anatoliya Navîn, Xorasan û Sîstanêjî Kurd hebûne. Ew Kurdên li Anatoliyê kîjan bûn û kengê hatibûn? Me gotibû ku berî Islamê Kurd bi navê Cûnûkî li Anadolê dijîn, dibe ku ew bin. Yan jî ewên di dema Harûn el- Reşîd (786-809) de li dora Qeyseriyê hatine bi cîh kirin bûn. Mesûdî di nav êlên Kurd de Celaliyan jî dijmêre. (3'92) Ezerbeycan: Hazbanî û Sarat (îhtîmaleke ku Şurat=Xaricî), hîna jî li xwarûŞadacan, Lazba (Lûrrî?), Madancan, Mazdanakan, Barisan, Xalî (Celalî), Cabarkî, Cavanî, Mustakan. (2 (l4) Di vir de Celalî wek Xalî jî tên nasîn ku gelek girînge. Gelo wê demê wek Xalî yan jî Xalîkan jî dihate binav kirin? Dibe ku herdû nav jî ji bi kar hatibin. Lewra Xalî navê wan ê kurdî û esasî, Celalî jî navê ku Ereban li wan kiriye ye. Yekê jî em dizanin ku Xelikî şaxekî Celaliyan ya girîng in.

Hezbaniyên di bin serokatiya Mehmet bîn Hîlal de di sala 906 an de serî hildan û heta Mûsilê hatin. Waliyê Mûsil Ebûl Hecca li hember derket û şer winda kir. Xelîfe Muktedîbîllah hêzaka nû şand, Kurd vekişiyan çiya û ji wir jî çûn Ezerbeycanê. Artê§ê, çiyayê Qendîl û hemû Kurd dorpêç kirin. Kurdan ji neçarî Hîlal teslîm kirin û Ereban li Mûsilê ew kuştin. Di wê

navberê de Îbrahîmê Deysem, dewleta Hezbanî yê Kurd ava kir. Paşê Mehmet Rewadî rêvebirî heyna û navê dewletê kir Rewadî. (ly'62)

Di sala 925 an de Celalivên li Şehrîzor serî hildan lê Hamdaniyan ew raperîna pêrçiqandin.|36tl) Di sedsala IX û X an de Kurdên Şehrîzor seri li ber xelîfe xwar nekirin û hîna jî zêde ketin nav tevgerê. Abû Dulaf wiha dinivîse: li wir Celalî, Yabsan, Hikmiya, Suvliyayên xwedî 60.000 malî rûdinên û xaka ku ew biçînin jî heye. (3'97) Gor demê hejmareke zêde ye, navê Suvliya jî bala me dikişîne. Dibe ku ew êla Sewêdî bin. Lewra gelek caran em Celalî û Sewêda jî bi hev re dibînin. Me gotibû, ku wana berê ji Ebbasiyan re wezirtî kiribûn û piştre li dij wan şer kiribûn. Ne dûre ku li wir gihîştibin hev. Kurê Huseyn dewleta Hesnewiyan di sala 981 an de li Şehrîzor û Demaiê ava kir. Lê di sala 1122 an de ji alî Tataran ve hate rûxandin. (9'313) Ji vê dîtine mirov dikare vê encamê û pirsê derxe: Gelo Celalî li vir parçe bûn, yên çûn bakûr dewleta Şadî-Rewadî ava kirin û yên din jî li Şehrîzor man desthiltdariya Ereban pejirandin?

Iro jî li wê herêmê hîn şopên Celaliyan hene. Edmûnd Leach dibêje: Piştî şer (şerû Cîhanê yê yekemin) û bi avakirina rê re, li Rewandûzê di navbera Rayat û Celalê de, qişleyeka eskerî ya mezin hate ava kirin.040 231 Hîna navê bajarokekî li heiêmê Celalî ye! Li Rewandûzê ji bilî nişteclhan, komên koçberan jî hene û yên herî mezin Herkî ne. Ez di nava Soran, Dergela û Balikan de mam. Balik êla herî fireh e. Ew êla ji sê milan pêk tê: Melle Şerifi, Şevdinî (yan jî Şûyîzûrî) û Şukrî. Melle Şerifi jî li Valaş, Rast û Celalê belav bûne, wêder ji

xwe re vvek navend dibînin. (140'26) Melle Şerîfiyan dibêjin ku koka wan ji êla Celalî ya li herêma Silêmaniyê tên. Navên xwe bi giştî ji bav û kalên hevbeş digirin. (140 35)

Rewanduz

Herêma Rewandûz04"llü)

Di sala 926 an de êlên Kurdan yen bi navê Gilalî-Celalî, Hemîdî (Behdînan), Muzûrîû Zîbarî îttîfaq kirin. Xelîfe jî ji bo ku îtîffaqa wan xira bike gelek fên kirin. Bi ser vê de gelek paye dan Celaliyan û li dora Tikrîtê bi cîh kirin. Serokê Celalî yê bi navê Heca Ebdullah bi leşkeren Kurd û Ereb ve erîş anî ser Hemîdiyan û dawî li mîrîtiya wan anî. Hemîdiyan di sala 947 an de bi Buweyhiyan re îtîffaq kirin û Behdînan heynan destê xwe. Pasê ew Hemîdiyan ji welat derdikevin û li ser hewara Selehettîn bi Eyûbiyan re diçin Misrê. Bi vî awî heta hatina Tirkan ya Kurdistan û Anadolê, navê Celaliyan bi piranî li dora Şehrîzor, Mûsil, Arran û Xorasanê derbas dibe. Piştî salên 1000 an, navê Celalî kêm derdikeve peş. Gelo sedema vê çi bû, Celalî çir bûn? Bi dîtina min; bi erişen Ereban re Celalî-Xelikî çûn Arran û Xorasanê. Ji wir jî bi hatina Tirkan re hatin Anadolê û çarçova wan teng bû. Yanî, eger berê ew konfederasyon bûne, xêre piştre belav bûn û wek federasyon û êl jiyana xwe berdewam kirin. Gelek jî di nav mîrîtiyên Kurd de belav bûn. Lê piştî sedsala XV an, bi erîş, zext

û komkujiyên Osmaniyan re serhildanên Kurdan dîsa destpê kirin. Ji ber hêz û şîddeta wan Osmaniyan ew bi navê Celaliyên berê yê ku Ereban nav lêdanîbûn binavkirin. Bi kurtî Kurdên di serhildanên piştî sedsala XV an de cîh girtine bi tevahî ne Celalî ne. Dibe ku dendik Celali be, lê hêzên din ên Kurd jî mil dane wan. Ji bo wê Celaliyên destpêkê ji yên dema Osmaniyan ve jihev bi tevahî nebe jî, cûda ne.

Cara pê§în em di sala 1519 an de dibînin ku kesekî bi navê Şah Welî, bi

4.0 kesî ve li Sêwasê serî hildide; Welî, begebeganê Sêwas Şadî Paşa têkbir û hêza xwe zêde kir. Lê di şere duyemîn de têk çû. Gor jêderên nûjen ew wek Celalî bi nav dibe. (131'191) Begê Şadî bi Celaliyan navê

xwe derbas dibe ve, berpismamên hev in û ew ji heman kokî ne. Lê carna jî bi vî awayî ew tên hember hev. Dîsa şâxekî Elewî yê bi navê Celai di nava sedsala XV an de li Tokatê raperîn pêk anî. Di vê serhildanê de begê Dulqadir Elî Begê kurê Şehsuwar ew têk bir; piştre Elî jî ji alî Qanûnî ve bi dizî hate kuştin. Mixabin gelek xizmetên wî jî ji dewletê re bûbûn. Serhildana Şah Welî gelek deng da û ji ber vê sedemê ji hemû serhildanên piştî vê re Celalî gotin. (l31'l91) F. Sumer jî vekirî tine ziman ku yên serhildan kiribûn ne tenê Celalî bûn. Yekê jî wê demê gelek ba^şe ku rêvebirên Osmanî, wek Sefawiyan, rêberên Kurdên ku jê ditirsiyan bi sûîkastan dikuştin. Bi vî rengî gelek serokên Kurdan kuştine. Ew yeka hîna jî berdewam e...

Di sala 1595 an de ji Atçekenê li Tûrgûtê (Canbeg) û ji êla Dawidlar kesek bi heman armancê derket holê. îddea dikir ku ew ji koka hukumdarê Selçûqî Aladdîn e û eger bê ser text ewê dadê û wekhevîtiyê pêk bîne.

Piştî serhildanên carna derdiketin, tofana esas di sala 1596 an de dest-pêkir û bû sedema gelek mirin, komkujî, koçberî û tevlîheviyan. Ji wê salê bigre heta sala 1775 an, ew tevgerana berdewam kirin. Ji ber wê, ji 38 gundên Enqerê-Baciyê 33 ê gund vala bûn. Dîsa di sala 1604 an de 36 gundên Haymana bi tevahî vala bûn. (I3<,‘34) Ji vê îstatîstîkê jî diyare, ku Kurdên li wan deran bicîh bûbûn bi tevahî cîhên xwe terk kirin.

Tevgera yekemîn a mezin ya Celaliyan Qere Yazici derxist û gor zanyaran, armanca wî ew bû ku Osmaniyan ji Anadolê derxe. Li Rihayê di sala 1599 an de derket tevgerê û begebeganî Helebê Huseyn Paşa jî tevlî wî bû. Wê demê sefera Awûstûrya berdewam bû û ji bo wê jî hate afûkirin û berê bû begebeganî Amasya, paşû jî bû yê Çorûmê. Ji sala 1603 an heta 1607 an li gelek cîhên Anadolê ji serhildana Yazici xûrttir raperîn derketin. Ji wana yek jî li bakûrê Sûriyê ya Elî Paşayâ kurê Canpolat bû. (l31'205) Di sala 1609 an de li Goksûnê di navbera Celalî û Kûyû Mûrat Paşa de şer

derket, li aliyê Celaliyan, boybegê Bozkir Mûslî Çavûş, ji Şam-Trablûsê kurê Seyf Yûsûf, ji Adanê Cemşîd, ji Sêwasê Meymûn, ji Enqerê jî Kalender Oglû bû. Celaliyan bi mêranî şer kirin, lê Osmaniyan top bikar anîn û Celalî têk çûn. Celalî reviyan Tebrîzê û dema gihîştin wir hejmara wan 13.605 kes bûn. Bi vî awî 30 hezar hate kuştin. (131*207) Ji wan bûyer û serhildanan jî diyar e, ku Celalî ne tenê êl yan

jî federasyonek e; ji serhildanên Kurd û Sersoran giştî re ew nav dihate gotin. Mümküne ku di dema Ebbasiyan de ew konfederasyon bûn, lê li Anadolê mirov nikare navekî wiha lê bike.

Hinek nûser dibêjin Celali 24 êl in û konfederasyon e. Pişt re ew dibin du şax, aliyekî 12, aliye din jî 12 êlên xwe hebûne. Beşbûna Reşiyan a Anadolê ya wek 12 êlan jî ji wir tê. Lewra Celalî du şax in û yek Xelikî yek jî Saka ne. Saka bi Reşiyan ve li ser heman bingehî ne û mirov di kare bibêje ew Reşî ne. Konfederasyona Celalî, li navbera Maku, Qers û Bazîdê de dijîn. Elên giædayî ev in: Alîmohaw, Belikan, Hasow Halef, Cenikan, Halkan (serokên Celalî piranî ji Xelika ne), Misrikan, Otabli, Kadikan, Qizilbaş û Sekan (SAKAN) in. Celalawendî li başûrû Kurdistanê dijîn, bi Gelû yen berî îslamê li başûre Zaxrosan dijîn re girêdayî ne. Bilikan, Cenikan (bi dîtina min ew Celikan yan jî Cûtikan in) û Xelikan niha li navenda Anadolê dijîn. Le niqta girîng ew e ku hîn êleka bi navê Saka di nava Celaliyan de dijî. Seferoglû dibêje: Sakan, yek ji 24 êlên Celalî yê li dora çiyayê Araratê dijîn e. Gor ve Saka li destê çepê yê Celaliyan şer dikirin. Destê raste jî Xelîkan e ji 12 qebîleyan pêk dihatibûn şer dikirin/917Ü) Mûrad Celalî, êlên Celaliyan wiha dinivîsîne: Xelikî, Cindiyan- Sule'êtîman, Qorixçiyan-Hesoxelefan, Butkan-Meyaka, Qo tan-Kes koyan, Gêloyan-Elemhoyan, Soran-Cumkan, Elyan-Gelturan, Misirkan-Pîlekan, Birxikî, Keçelan, Hesesoran, Sakî, Êla Bozxorê-fêyala, Qatkan-Qîmkan, Mametkan-Giskan, Qeleşan-Qûrrûyan, Deloyan,

Banûkan-Hîndîrîsan, Şemkan, Reşreşkan, Qizboxşoliyan, Omkan, Sêxbiziniyan, Qereçoliyan, Zilfoyan ın. (xelkcdondurma™m) Pilekan niha li Xorasanê ne. Şexbizinî zaravê Lorî diaxifin û Reşî jî di navê de cîh digirine, ew yeka jî îddeayên me li ser Celaliyan bi hêztir dike. Yanî, Celalî ne tenê êlêk, zendek yan jî zarava axifek e; Celalî navê Kürden serhildêr û Kurdên li hember sîstema Ereb û Osmaniyan e...Ew wêne jî dide xuyakirin ku navên din ên mîna Tirkmenên Helebê, Bozûlûs û hwd jî bi vî rengî ne.

Ş. Firat dibêje: Celalî berê li zozanên Qonya û Qeremanê dijiyan; paşe hafin dora çiyayê Ararat û bi cîh bûn. (127'8) Gor "Tarîxa Varto", Celalî berê li Qonya û Qeremanê bûne û Yawûz ew şandin Agiriyê. "Tarîxa Wanê" jî dibêje: Ew hatin zozanê Abaxa û li dora Makuyê zivistan derbas dikirin. 24 ber/tîrên wê êlê he ne ku 12 Xelikan eu 12 jî Saka ne. Şaxen wê:

- Keçelan
- Goran
- Budikanî
- Reşkî
- Çumkan
- Hasasuran
- Temehoran
- Berxikanî
- Misrikanîl128127' Misrikanî re Pîlekan jî tê gotin û beşekî niha li Xorasanê ne.

Birêz Wekîl Mûstafayev dibêje: Serokê Celaliyan yê Ezerbeycanê navê xwe Koroglû ye. Bavê wî kor bûye û ji bo wê jî Tirkan ev leqeba lênan.

Navê xwe yê rastın Rewşen bûye. Li hember Tirkan û Ezeriyan serhildan çêdike. Er¬menistan di destê Celaliyan de ye; wê demê 4-5 zend êlên Kurdên li wir in. Yek ji wana Celalî û yek jî Qereçorî bû. Serokê Qereçoriyan Qaçax Nebî ye û berê serokê Qerebaxê (1813), pa§ê jî ê Nahciwanê bû. Qereçorî ji milyonekî zêdetir asîmîle bûn. Niha 10 malên ku dibêjin em Kurd in tu dikarî peyda bikî. Navê gund û çiyayan maye, lê Qereçorî bi xwe tunin. Celalî dibin du beş: Yek Sêvka yek jî Celalî ye. Eger ew îddea rast bin, wê demê Sêvka bi Saka ve têne heman watê.

Şaxên Celaliyan: Kotanli, Soranli, Sagan, Keçalan, Dutkan, Kapdekan- li, Hesenan, Cînankan. (I2'279) Kotanli niha wek êleka di nava Qerekeçîliyan de xuya dike û li Serxetê dijîn.

Di salên 1850-56 an de rewşenbîn? Kurd Mela Mehmûd Beyazîdî wiha dinivîsîne: "Ew ji 2000 malan pêk tên, li dora Agirî û Bazîdê dijîn û mala axê wan her dem ji Mala Xidir Lale der tê û diçin Iran û Rewanê jî. Elên xwe: Xelkan 500 xane

Qizilbaş Oxliyan 500 "

Conkan 500 "

Hesen Soran 300 "

Time Xûran 200 <177-'>

Dr. Frîtz jî di wê fikrê de ye û bawer dikim çavkaniya wî jî rehmetiyê Beyazidî ye.

Gor rapora dewleta kûr a Tirkiyê (Arteş-îstîxbaretê) bi mora "pir pir bi veşartî" hazir bûyî (1970) Celaliyên li Kurdistanê bi vî awayî ne: Hejmara wan: 83.445 kes in; henefî û şafû ne; Kurmanc in. Mil û berên wan:

- Başimî: Agirî; Hallesînî: Diyadîn û Agirî navça navend.

- Bilikan: 1400 kes in û şafû ne. Li Bazîdê û gundên: Gozukara, Saxdiç, Kazan, Sariçavûş dijîn.

- Bilikan (Hasedsalaasoran-milê Badilî): 4200 kes in, henefî û şafû û Kurmanc in. Li Eleşgirt gundên wê tevlî serhildanan bûne.

- Bilikan (Milê Şadî): 3250 kes in; şafû û Kurmanc in. Li navenda Wanê-bi Kinyas Kartal ve girêdayîne. Eleşgirt û çend gundên wê tevlî serhildanan nebûne.

- Cumukanli (Cutukan): 2675 kes in, şafû û Kurmanc in. Li Eleşgirt û çend gundên wir dijîn. Tevlî serhildanan bûne.

- Xelikan (Milê Hindîrîs): 400 kes in, şafû û Kurmanc in. Li Taşliçay û Tûtakê dijîn.

- Xelikan (milê Sîpkî): 18.000 kes in, şafû û Kurmanc in. Li Tûtak û gundên wê dijîn.

- Xelikan (milê Sîpkî): 10.600 kes in, şafû û Kurmanc in. Li Eleşgirt û gundên

wê dijîn.

- Xelikan (mile Sîpkî): 2.650 kes in, şafû û Kurmanc in. Li Tutak, Patnos û der dorên wir dijîn.

- Hasedsalaasoran: 11.650 kes in, şaftı û Kurmanc in. Li Bazîd, Taşliçay û Diyadin û gelek gundên wê dijîn.

- Kotan: 10.260 kes in, şafû û Kurmanc in. Li navça Bazîdê rûdinên. îddea dibe ku ji Qonyayê hatine; tevlî serhildanan nebûne.

- Kotan (Gelturan û Keskoyî): 1650 kes in, şafû û Kurmanc in. Li Taşliçay dijîn.

- Sakan: 6590 kes in, şafû û Kurmanc in. Li Bazîde dijîn; berê reviyane îranê, paşe vegeriyane û demeke li Qeyseriyê bi cîh bûne.

- Şemkan: 800 kes in, şafû û Kurmanc in. Li Taşliçaye diminin û tevlî serhildanan

nebûne!108'42)

- Celalî: Li Qers, Dîgor, Sûsûzê dijîn, henefî ne û Kurmanc in. Bi tevahî 3306 kes in.

Xelikan (şaxen xwe: Alîmenolû, Aliyanli, Geloyî, Geltûran, Hindirîsî, Keskoyî, Kotan): Tevayî hejmara xwe 21131 kes in; li Tûzlûca, Aralik û navça navendiya Qersê dijîn. Kurmanc û şafû ne. Tevlî serhildana Agirî bûne, têkiliya xwe bi îranê re hene. (ins ı88) Yen min li Xorasanê ziyaret kiribûn divê parçê wan bin.

Tê îddea kirin ku di dema Osmaniyên pöşîn de, Xelîfe Alaûddevle mirovekîbi navê Hallîgan ê zanyar dişîne Anadolê. Ew mirova mêze dike ku xwendin û nivîsandin kêm e û peşniyaz dike ku dibistan bên vekirin. Bi ser vê de li Xelikên Jêrin-Qonya Îbn-î Hallîgan mektebekê vedike. Bi ser vê de navê vê navçê bû Xelikan.'p’4“331 Ew dîtin bi min rast nayê, lewra navê gundên li navenda Anadolê bi piranî ji navê êlê tên.

Tarîxa Wanê, Dînaiyan (Donuyî) wek milekî Celaliyan nîşan dide; di kovara "Tarama" de tê îddea kirin ku ew tê wata tobekaran; Ew êlên: Reşkan (Eşkanî), Mesgûran (Beşguran-Bûlxaran) û Bedirxanan dikin nava xwe. (l04'27)

Şere Şah Ebbas û Emîrxanê Çeng Zerinî yê Kurd sewa Celaliyan der-ketibû; yan jî ew kiribûn bahane. Şah Ebbas xwest ku Emîrxan 8000 ji Celali¬yan di nava êla Biradost de bi cîh bike, lê Emîrxan ew yeka qebûl nekir û bû sedema şer. Celaliyan û hêzên îranê erîşî Xan kirin (1608). Şer çar mehan dom kir, Emîrxan têk neçû. Paşû Celaliyan jî li hember îraniyan şer kirin û beşek bi veşartî derbasî xaka Osmaniyan bû319’95) Di wê bûyerê de çima Celaliyan berê bi Şah re paşâ jî li dijî Şah şer kiribûn,

sedema vê çibû? Bi dîtina min eşkere bû, ku Şah ewana ji bo armancên xwe yên qirêj bi kar tîne û yekê jî hovîtiya Sefawi- yan ya li dijî Kurdan divê Celaliyan tahamûl nekiribe û li dijî Şah şer kiribin.

Li ser navê Celaliyan em salnameyekê jî dibînin. Ew salname dibe ku Tirkan ji Kurdan girtibe, lewra sîstema wê bi kevneşopiya Kurdan ve yek e. Li ser vê yekê nivîskar dibêje: Tirkan salnameka bi navê Celalî jî bikar dianîn û ew li ser navê Melîkşah hatibû avakirin. Gor sala-rojê hatiye avakirin û sersal

21 ê Adarê û piştî mirina Melîkşah dev jê hatiye berdan. (148'21) Bi vî awî hertişte Kurdan jê stendin û kirin male xwe.

Dema mirov sîstema Celaliyan, êlên di nava wan de û pêvajoya dîrokî ya ku ew jê hatine baş lêkolîn bike, dibine ku ew Saka bi xwe ne. Bi hezaran sal berê, wek Saka dihatin binav kirin, pa§ê Ereb û Osmaniyan jî ew kirin Celali. Navê Celal jî ji ber şervanî û lehengiya wan li wan hatiye dayîn.

TIRKMENÊN HELEBÊ

Heleb navendeke girîng a bazirganî û pireka di navbera gelê Kurd, Ereb û Ewrûpiyan de ye. ji Xorriyan heta dema Osmaniyan ya dawî, gelek ca- ran Kurd bûn xwediyê wî bajarî û rêvebirî jê re kirin. îro her çiqas wek bajarekî Ereb tê xuyakirin jî di esas de bajarekî Kurdan e. Berî desthilatdariya Osmani¬yan ji alî Kurdên Mirdêsî ve dihate birêvebirin. Paşê/ di sala 1516 an de, piştî şem Mercîdabiqê kete nava tixubên Osmaniyan. Ji bo defterlixa Helebê jî Abdî Çelebi yê kurê Abdullah Paşa hate tayîn kirin. (170'688)

Gor sîstema rêvebiriya Osmaniyan wîlayeta Heleb ji van bajaran pêk dihat: Şam, Dîlok, Bîrecîk, Hama, Sûrîıç, Ravendan, Mûnbîç, Rûk-Kala, Gün¬düzlü, Bagras, Kinik û Meletî digirte nava xwe. Tirkmenên Helebê, heta Tirk- menên Yenî II (Yozgat), Dulqadir û Boz Ûlûs jî belav dibû.

(17ü689) Di nav êlan de koma herî mezin Tirkmenên Helebê bûn; zivistan li Helebê, havînan jî heta Qastamonû yê belav dibûn.

Heta sedsala XVI an du kom hebûn ku bi tevahî koçber dijiyan; yek ji wana Tirkmenên Helebê bûn ku di navbera Uzûn Yayla û Helebê de diçûn û dihatin, di salên 1540 de 9316 xane ne. (l31193) Yên din jî Boz Ûlûs bûn.

Di sedsala XVI an de Tirkmenên Helebê ev bûn:

Dulqadir (Boz Ok): Li Elbîstanê dijîn. Zivistanan li Amîk, Heleb û Çûkûrovê dijîn. Gelek jê çûn Iranê; zendek jê çû Amedê û tevlî Boz Ûlûs bû. Dîsa hinek ji wan li Yozgatê bi cîh bûn û hinekan jî Yenî-îl pêk anîn. Di sedsala XVI an de ji wan hinek êl heta Enqerê çûn; Qeyserî, Kirşehîr jî herêma wan bû. Paşâ hinek ji wan (Cerîd, Tecîrlî û Axca Koyunlu) li Çûkûrovê bi cîh bûn. Li Qers- Qadirliyê jî êlên Dulqadir hebûn, ew: Varsak, Demûrcî, Qeremanî, Selmanî, Zakirî, Kavûrga, Geçlik, Eşkînciyan in. (131'195) Beşek ji êlên li Anadolûyê, di serî de Şûxbizin dibêjin beşekî me ji Qersê hatiye. Varsak îspata ve ye. Ew zenda mezin ji van êl û federasyonan pêk tê:

a- Anamas/Qaraca: Yazir, Sevînç, Orûç-Beg, Ûlaş, Ûrçan, Kazanca, Söylemez, Yol-Basan, Qere-Haytal.

b- Dokûz/Bişan: Karkin, Qeremanî, Kurd Mihmad, Avci, Demrek, Haciyan, Neccar, Dokûz-Koyûn, Bazlamaç, Qere Goncû. c- Kureciyan.

ç- Cerîd: Bayir Cerîd, Qere Hesenî, Orûç Gazîlî, Mamali. d- Peçenek

e- Kavûrga-Sîs (Kozan) e- Elçî f- Dongele g- Küşne

h- Yuva (Qere Yuvali) i- Teke-lû

î- Varsak: Li Qers-Kadîrliyê Varsak, Demûrcû, Qeremanî, 5elmanı, Zakîrî, Kavûrga, Geçlîk, Eşkîndyan. Ji marûzatê tê fêhm kirin ku ew Şexbizinî ne. j- Axca Koyûn: Çaliş, Mûsa Hecî, Mûsaca, Kozan, Hamîdî. k- Eymîr/Eymûr:

Bûsûz, Dundarî, Tosûn, Qere-Goz, Çarik, Affan, Sancakî, Yûsûf, Hed Bayram, Afşar Eymûrî ne. Ew di sala 1692-3 an de li Humusê bi dh kirin. 50 malên xwe li Kirşehîre günde Nusretlû bi dh bûne.<l3I 34n)

1- Çîmelî. m- Kizil. n- Îman-Afşar. o- Çaxirxan. p- Avd. q- Gündeş.

rrı zs /T Zv. A

r- Tecır/Tacırı.

s-Eşkînd: Dede Karkin, Qere Ahmed, Sûlî Şexan. (131

Eşkereye ku ew zendên han, pişti mîrîtiya xwe bi navê Dulqadirî hatin belav kirin bi şûnde, di qeydên Osmanî de wek Tirkmenên Helebê têne binav kirin. F. Sumer dibêje: Di destpèka sedsala XVI an de êlên girêdayî vê zendê heta Enqerê hatibûn; Qevserî û Kirşehîr jî di nava herêma dh bûna wan de

bû.n.TM«}

1. Şahin jî êlên girêdayî Tirkmenên Helebê wiha dijmêre û gor salan serhejmar û navê serokên wan dide.

Elên girêdayî, hejmar û Begên wan:

Nav 1520 1525 30 1536 1552 1570

1- Beydîlî: a: Bekîrbeg b: At-guden Bey, c: Yalvaç Beg 3 43 ce meet 39 66 69

2- Bayad: Seyf Begê kurê Xelîl Beg, boy Begê xwe. Ji 11 êlan pêk tê û 12 Begên xwe hene. Bozca, Pehlewan, Çunker, Il dilek, Şemek, Salvat, Tohtemûr ne. 11 cemce t20 31 52 47

3- Avşar: 9 15 19 5 4

4- Gunduz: Di sala 1482 an de li hem-

ber Osmaniyan li Edene şer kirine. 5 8 7 6 6

5- înal:	5	15	24	10	11
6-Avşar (Beylik)	6	5	6	6	9
7-Harbendelî:	1	18	22	19	35
8-Peçenek:	—	—	—	6	6
9- Oyrad:	—	—	—	—	•>
J					
10- Toktemûrî:	—	2	7	Bayat	Bayat
Serbixwe:	40	62	59	47	51

Di sala 1570 an de bajarê Osmaniyan ê heri mezin Stenbol, yê duyemîn jî Bursa bû, ku §êniyên xwe 55 000 bûn. (17,,7l2) Serhejmara Tirkmenên Helebê jî 59 hezar e ku ew texmînî ye. Rastiya Kurdan eğer mirov bide ber çavan ew hejmara hîna jî zêde dibe. Lewra di hinek jêderan de ew yeka vvek 80 000 tê nîşandan ku bi dîtina min ya rast ew e.

BOZ ÛLÛS

Dr. Tûfan Gündüz dibêje: Ji ber çi ew nava girtine nayê zanîn. Faruk Sumer jî mecbûr maye ku texmînan bike: Ji Pezgewran xêr ji Bozok û Uçok an hinek êlên Kurd jî mabûn; ji bo ku evv ne ji rengekî bûn îhtîmaleke ku Bozûlûs bi kar anîne, dibêje. Navê Boz di nava Pezgewran de nîne û îhtîmaleka mezine ku Osmaniyan ew nava dane ser. (,15'46) Min li jor jî gotibû ku ew nava ji Zerikiya kurdî û ji bo ku Kurdên wan êlana bi piranî çîl-kej-zerî bûn ew nava lê nan.

Bozûlûs bi tevahî nebe jî, beşekî xwe piştî şere Fba M. Xorasanî hatin bakûrê Kurdistanê; demekê jî diçûn Sûriyê lê di dawî de di navbera Erzirûm û Mêrdînê de dijîn. Ew beri hatina wan ê Anadolê bû. Ew yeka ji alî nûserên Tirk ve jî tê qebûl kirin: Bozûlûs di navbera Erzirûm û Beriyê

de dijî. Hîna ku neçûbûn Anadolê 250 salî li vê herêmê jiyan. Ew jî teqrîben dibe sala 1290 an (iis-us) gj yj avvî sedsalan jiyana xwe berdewam kirin.

Me di beşa Tirkmenên Helebê de jî ragihand ku komên heta sedsala XVI an tevahî koçber dijiyan yek jî Boz Ulûs bû ku zivistanan li dora Mêrdîn û Firat, havînan jî di navbera Ezingan-Erzirûmê de derbas dikirin. Boz Ulûs jî di sala 1540 an de 8013 xane ne. Di vê sedsalê de Tirkmenên Helebê, Boz Ulûs, Dulqadir û Boz Ok bi peyva Tirkmen dihatin xwendin. (131193> Gor wê demê gelek kes in, mirov dikare texmînî bibêje 50 hezar kes in. Ya herî girîng jî ew e, ku heta wê demê kalê me wek Tirkmen dihatine bi navkirin, ku ew jî sîstem û teoriya Tirkan ji serî heta binî hildiweşîne.

C. Orhûnlû jî dibêje: Boz Ulûs, di sedsala XVI an de li dora Amedê dijîn. Zivistanan ji Mêrdînê bigire heta Deyrî Zor belav dibûn; havînan jî heta Erzirûmê diçûn. Lê di destpêka sedsala XVII an de hatin Anadol û Qeremanê. (9ü,7) Ji bo ku dawî li vê bînin, di salên 1613 û 1614 an de ji Qadî û Begebegan re emirname hatine şandin. Lê dîsa jî nikaribûne pêşî lê bigirin. Yên ku li Enqere, Aydin, Kütahya, Qeremanê dijîn bi navê herêman û yên li Enqere li navça Keskînê dijîn jî bi navê Keskîn ji yên din dihatin cûdakirin.

Bi dayına Mukataaya ew îdare dibin. (9rM7) Ji vê şirove em fêhm dikin ku navên êlên li van herêmana bicîh bûne, hatine guhartin. Bi navên nû û yen herêmê hatine qeyd kirin. Yen li Qeremanê 13 êl bûn û cotkarên has bûn. (90'17) Eger mirov bibêje ku yen îro li wan deran dijîn ew in, dikare şaş bibe, lewra pişti wê demê jî gelek tevlîhevî, serûbin bûn pêk hatine. Ji bo me xala girîng ew e, ku dewletê nexwastiye ku ew bên. Mumkune ku dewletê wê demê jî dixwest wana li dora Devri Zor bi dh bike.

Boz Ûlûs ji sê beşan pêk dihat; ew: Tirkmenên Amedê, Dulqadirî û Tirkmenên Helebê ne. (131',%) Gor tespîta min, Tirkmenên Amedê mirov

dikare li dora federasyona êlên Têrikî, Oxcû û Zerikiyan kom bike. Bê guman gelek êl hene, lê ji bo ku hêsan bê fêhmkirin wiha baştir e.

Tirkmenên Helebê jî dikare li dora Reşiyan kom bike. Ew yeka ji alî Orhûnlû ve jî tê pejirandin: Tirkmenên Helebê û êlên girêdayî Yenî îl (Haslari) ji çend salan wir ve li edetên xwe yên kevn muxalefet kirin, diçûn eyaletên Anadol, Qereman û Rûm. Ji bo ku dawî li vê tevgerê were 26ê Kanûn a 1613 û 25ê Çile ya 1614 an de ferman ji waliyên eleqeder re hafin şandin. Lê dîsa jî bi ser neketin. Li Yenûl (Newşehîr) zozanên xwe yên musteqîl hebûn. Dîsa jî bi hemû giraniya xwe ve dihatin Qereyela di nava eyalata Rûm ê; mal dişewitandin, zeviyên gel didan pezên xwe. Ew êlana Barak, Bayindir, Duresînlî û Reşî bûn. Di sala 1686 an de, ji bo ku ew êlana ji zozanên xwe yên musteqîl neçin cîhekî din, bala kesên eleqedar hafiye kişandin. (90‘40> Di Dulqadiriyan de jî gelek êl hene, mîrîtî avakirine û mirov dikare komên mîna Canbeg, Sewêdî û Milan di navê de kom bike. Wekî î. Şahîn dibêje: Di nava Bozûlûs de, ji Dulqadiran 40 êl hafine tespît kirin, lê ji ber ku êlên mîna: Avşar, Çaxirgan, Cerîd, Qaraca Arap, Gündeş, Çîmelî, Dodurga ji êlekê zêdetir têne temsîlkirin 101 êl di nava Bozûlûs de hene. Li destpêke, rexistina zendê ya ku bi yekbûna êlan pêk dihatî di nava Bozûlûs de tunebû. Piştî hatina Anadolê êlên ji Taban û Oxûlbey veqetiyan, ji alî boybegan ve dihatin birêvebirin.<11:>'46) Yanî wekî Reşiyan ne federasyoneka bi rêxistin bûn.

Taybetmendiya Tirkmanên Amedê e w bû, ku ew êlên ji Pezgewran mayî bûn. Di beşa wan de jî me gotibû, lê vir jî qetî dibe ku di navenda Pezgewran de Têrikî hebûn. Tirkmenên Amedê baqiyê Pezgewran e û ji van êlana pêk tên: Taban, Oxûl-Beg, Mûsilan, Pûrnek, Hamza Heciyan, Koca Heciyan, Izzeddîn Heciyan, Silêman Heciyan, Şêxan, Danişmend, Salar, Çavûndûr, Dodurga, Doxer, Karkin, Avşar, Bexdilî, Alpavût ê. Dulqadirî jî ji van êlêna pêk tên: Cerîd Siltan-Heciyan, Kurd Mihmadî (ji

zenda nehan/9 an e), Koçekî, Küşne, Anamas, Avci, Dodurga, Cecelan, Çîmelan, Avşar, Qaraca Araban, Eymîr, Gundeşî, Çaxirxanî, Kizil Koca, Şam Bayadi, Karkin Mûsaca-Mûsa Heciyan (ji Axca Koyûnlûyan e). Tirkmenên Helebê jî ev in: Kopeklî Avşari, Gunduz Avşari, Harbende, Begdilî, Acûr, inal, Bayat û Qara Koyûnî ne. (131’196)

Nûserên Tirk serhejmara Bozûlûs didin, ku li gor wê demê gelek e: Bozûlûs di sala 1540 an de 23.516; yên Dulqadiran jî 13.847 kes in. Di dema Selîmê II an de Bozûlûs 63.056 kes in. (115 l05) Tirkmenên Bozûlûs ji alî serhejmar de ji gelek bajarên Anadolê zêdetir bûn; ji bo wê hikumetên navendî tim dixwestin ku wê hêza muazzam a tim di tevgerê de, têkin bin kontrolê. (ll3~165) Di gelek jêderan de jî serhejmara Bozûlûsan a sala 1540 an 37.363 nefer in; herdû serhejmar jî ji gelek bajarên Osmaniyan zêdetir in.

Êlên ku Bozûlûs pêk tînin:

Aba Kurklu, Acurlû: (523 malbat/ 361 nezewicî). Berê li Keskine bûn. Paşe di nav Pehlewanî, Reyhanı, Hecî Ahmedî de belav bûn û 20 xane jî çûn Ba]ikesîrê. (ll5‘48) Axcalû, Ala Hecî, Alî Goren, Aliyan, Anamasan, Anter, Arap, Atçi, Avanan (Enqerê-Tabanli), Avci, Avşar (di 1407 an de li hember Memlûkan serî hildan û tevlî Pezgewran bûn. Li Enqeiê, Rakka, Hamayê hene), Azaplû, Bayat, Bex Coker, Bexdilî, Bekir Heciyan, Bozhan-Borean, Cerîd/Sîl-Supur (Keskin. Li sala 1613 an hatin Çanqiri û biTecîrî ve şerkirin. Ji Rakkayê bi şûnde li Qirşehîr Çîçekdaxi û alî Bozokê belav bûn), Cerîdî Siltan Hecîii, Çaxirgan, Çavûndûr, Çayan (li Qereman, Nevşehir, Ûlûkişla, Erexlî), Cecelî, Celahîr, Çîmenî, Çepnî, Çîçekî, Çopû, Çûbe, Danişmendî (di navbera Aydin, Enqere, Qereman), Isheq Danişmendî. Dodurga, Dokuz, Dolûlî, Doyran, Doxer, Ensalî, Eymûr, Gevheri, Gundeşî, Gıınduzî, Heciyan, Xelîl Hecyan, Hamza Heciyan (Qereman, Sêwas, Antalya, Qerehîsari Sahibe), Harbende, Haydarı, Huseyn Heciyan (Haymana-Toyaç

nişstecîh bûn), llanî, Ilbexî, Il-Emîn (Derbentçî), Inalî ()i şere Moxol û Memlûkan bi şûnde 40 hezar xane xwe avêtin bextê Memlûkan û wan jî ji Gazê heta Antakya ew bi cîh kirin ku Înalî jî di nav de bûn û li Enqerê Tabanî jî hene), ivaz, Îzeddîn Heciyan (Sêwas û Qereman, Espkeşan günde Atlandı), Kamkam, Qerebax, Qaraca Arap, Qereman, Kargaç, Qere Hesen, Qerekoyûn, Karkin, Kutur, Kilhor, Kiçi, Kizil Koca, Koca Heciyan, Koç, Kozgucek, Kutbex, Kûtsîn, Köçek, Kurd Mihmad, Kurdenkûre, Kûşer, Küşne, Lek (Di nava Bozûlûs de, di sala 1540 an de du cemaat û 108/14 xane hebûn. Şaxekî xwe li günde Şex Alî Dorcû yê girêdayî Harranê bi cîh bûn. Tevlî koça Bozûlûsan ya Anadola Navîn nebûn; bi Bozûlûsên li Amedê ve tevhev koçberî Rakka bûn. (1I589) Mûsaca, Mûsil, Oxûlbex, Pûrnek, Salar, Sari, Silêman Hecî, Ser Kovan, Şâx (Keskin), Şex Mihmad, Taban (Enqere), Tecer, Tekelî, Tûtgak, Evran, Uzûnan, Yabaltûn, Yavila (Enqere), Yellî, Yûrtçû, Zaxferan, Serkeme û Aşiyan ne. (115"104) Wekî xuya dike gelek el di nava Boz Ulus de hene. Balkeşe ku êleka bi navê Zaferanî jî heye ku di beşa Xorasan de me qal kir. Ew jî îspateke ku ew nava ji alî Osmaniyan ve lê hatiye dayîn û yen Xorasanê jî ji bakûrê Kurdistanê çûne. Ji navên din mümküne ku mirov zêde tişt fêhm neke; lê, bi kurtî dikarim bêjim ku di nava vê zendê de: Canbeg, Sewêdî, Zerikî, Têrikî, Milan, Sêxbizin, Oxçû û komên din hene...

Dr. T. Gunduz dibêje: Hinek Tirkmen ji alî Hesenê Dirêj ve ji Tebrîze re hatin birin. Hinek derbasî jiyana rûniştinâ bûbûn û hinek jî li Rakkayê hatibûn bi cîhkirin. Li Anadolê jî destûr hate dayîn Boz Ulûs, ku ew herin zozan û germiyanan. Lê di sala 1673 an de nikarîn li ber giraniya malî rawestin û dîsa belav bûn. Ji ber vê li hinek bajarên navendî ew kom bi kom bicîh bûn. Li navenda Aydinê herêma ku Afyon, Bolvadîn, Emîrdagi, Sandikli û Manîsa dikire nava xwe de komên mîna: Germene, Çökelek, Şam, Çatak, Kirca, Maksût...hwd dijîn. (115‘148) Em dizanin ku hinek

malbatên Canbegî yên li Kuşadasi ya Aydinê di sala 1659 an de bi cîh bûn. Taxeka Kuşadasiyâ ew ava

kirin. Li Qeremanê komên mina: Heciyan, Qereman, Abdurrahman, Deriyan, Qerehesen, Qerexelil, Çavûndûr û cemaatên mina: Çatak (îro jî gundekî bi navê Çataqê li Cîhanbeyliyê heye), Emrîud, Izzeddîn, Küşne, Silêman Heciyî, Çayan bicîh bûn. Li Enqerê; Taban, Qereman, Avan, Kûşçû, Bayati Atik, Bayati Cedîd, Çaxirgan, Qerekoyûn, Dokûz, Bayram Bex, Alî Goren, Emin, Yûlar, Avşar, inal û Danişmend, Yîva û Konûrûyê girêdayî Taban û Danişmendî, Çarsak, Kose, Silêmanî, Tokmak, Emin, Kose Avşarye girêdayî Qereman bi cîh bûn. Sêwasê komên mîna: Alî Goren, Kaya, Emîn, Seydî, Çayan, Hamza Hecî, Kufur, îzzeddûn, Avan, Küşne, Oxûlbeyê bicîh kirin. Bi vî awayî çar beşên îdarî pêk anîn. (ll5148) 14 salan piştî belav bûna Bos Ulûs ji wan re fermana tevlî şer bibin tê. Bi vî awî dixwazin ku Kurda bi Kurdan bidin kuştin.

Ji bo serhildana Gedîk, wazîtedarkirina Boz Ulûs: Ji begebegan yê êla Tabanlûya girêdayî Boz Ulûs û ketxûdayên û rûspiyên wan re! Gedîkî ji dewletê re îxanetê dikin û şîddete bikar tînin, bi bajar bi bajar diğerin û li gel xirabiyan dikin. Ji bo pelçiqandina wan min wezîrê xwe Ahmet Paşa wazîfedar kiriye. Hûn jî bi êla xwe û kesên destên wan çek digirin pêwîste bi paşa re alîkar bin. Yek ji kopya wê fermanê ji: Êlên mîna Koçeklî, Mamali, Bayaz, Akbaş, Recep, Çîxdem, Pehlivan, Ketiş Oglû, Kizik, Abal, Il Bexliyên li Tokatê re û yek jî ji voyvoda Reşiyan Yûsûf û ji serokên civatên Hecî Bereket, küren Ferhat Paşa, Esme Hesen û Hesenê Mezin re ez dişînim, sal 1100-1687. (,h,78)

Osmanî ji hêzeka mîna Bos Ulûsan ya mezin nerihet bû; eğer ew li cemhev bibiyana ji kontrola wan ditîrsî; lewra serhejmara wan ji gelekbajaran zêdetir bû. Ji bo wê biryar dan ku wê hêza mezin parçe bikin. Di sala 1691 an de kirin çar parçe; koma yekemin li Bala bi cîh kirin, ji ber ku serokatiya

wan êlan Taban dikir ji wê re "Mukataa Tabanlû" gotin. Malbata begê wan li gundê Uç-em rûdinişt û heta îro jî ew hene. Qaraca Kurd Tirkmen (bi dîtina min ew ji Milan in) û Tirkmen Kurdî li Kirşehîr û Nevşehîre bi cîh bûn. Milê didûyan li Akşehîr-Îlginû bi cîh bû. Ev mila ji Hamza Hecî, Avşar, Küşne, Şerefi, Danişmendiyan pêk dihat. Milê sêyemîn li Afyon û Kütahya dijîn û ji Oxûl- Bex, Köçek, Izzeddîn, Kurd Mihmad û Gundeşî yan pêk dihat. Milê çaremin jî li Aydinê nişteciîh bû. (131'2lW) Ew êlên hanê yê bi vî awayî hatin parçekirin û dewletê xweste bicîh bike jî, bûn sedema gelek aloziyan. Ji bo wê dewletê vê carê jî biryar wergirt ku wan bişîne Rakkayê yan jî deşten Sûriyê.

E w hewldana dewletê jî bi tevahî bi ser neket; êlên li wir hatin bi cîh kirin di firsenda yekem de reviyan Kurdistan û Anadolê. Ji bo ku êlan dîsa bişîne deştön Sûriyê, dewletê şîdeteka mezin jî bi kar dianî. Wek nûserê Tirk jî dibêjin: Ji bo ku êlên ji Rakkaye reviyabûn dîsa vegerînin carnan şer derdiket û top jî bikar dihat. Li ser wê gelek ferman hene ku yen neçûn cîhên îskanê bi tevahî di şûr re bên derbas kirin. (115'151) Bi vî awayî gelek Kurd di komkujiyan de derbas kirin. Iro li Çûkûrovê û gelek cîhên Kurdistanê mîna Dîlok û Germiyanê, cîh û herêmên mîna "Rişvan Gedîxî"(Geliyê Reşiyan) hene ku bi wan komkujiyan tên xwendin.

YENÎ ÎL

Gor sîstema Osmanî, coğrafya Yem îl: herêma di navbera bajarên mîna Qeyserî, Sêwas û Meletiyê û navçên mîna Mancilik, Gurun û Hekîmxanê de ye. Ew herêma bi milên çemê Kizilirmak, Firat ve hatiye sînor kirin û ji başûr ve jî çemê Seyhan û Ceyhanê hene. F. Sumer dibêje: Ji navbera Mancilik û Gurunê re jî Uzûn Yayla tê gotin. (13,'197) Ûzûn Yayle ji bo Kürden Koçber cîhekî stratejik û navdar e.

Wekî me berê jî gotî, gor herêman bi navkirina êl û zendan ji bo Yenî île jî derbas dibe. Osmaniyan bi vî navî qeyd kirine, lê em dizanin ku nave

wan ê esasî beşekî Reşiyan û Sewêdî ne. Di belgeyan de ew kom wek "Üsküdar Tirkmenî" jî derbas dibe; seva ku ji bo diya Mûradê 111 an Nûr-Banûyê li Uskudara-Stenbolê mizgeft çekiline ew nava lê hatiye darım. (13M97) Üsküdar Tirkmenî ji bo Sewêdiyan bi kar tê, ew ji alî mezinê wan vê jî tê piştrast kirin. Ji Beşqewaxa Biçûk (Cîhanbeyli-Qonya) Seyid Tewfîqê FFecî İbrem (Altinpinar) jî di hevpeyvîna min ya di sala 1999 an de kiribû, ev yeka dipejirand: Koma Yenî-Îl ji du milan pêk tê: Yek Dulqadirî ne, yek jî Tirkmenên Helebê ne. Ji Tirkmenên Helebê re Yaban Er! jî tê gotin; ji bo ku tenê havînan dihatin Yenî îlê ji wan re Şamî jî tê gotin. Piraniya Yaban Erivan Bexdilî ne, ku ji van êlana pêk dihatin: Bexdilî, Bayat, Avşar, Bayindir, Harbendelî û Beranî ne. (131' m Yaban Erî Reşî ne; têkiliya Bexdilî û Nasirên girêdayî Reşiyan jî heye, dibe ku yek êl bê.

Seyidê Tewfîq

Sîlsupur-Sîlsupur Cerîdî ji Boz Ûlûs in. Ew ji 250 xanan pêk tên û ji baca male wan 450 kuriş zem hate kirin û li Yenî île bi cîh bûn/’60'6681 Sîlsupuren ji bo Milan û êla Hewêdî û cama jî ji bo êla Reyhanî/Celika-Kabalar bi kar tê.

Kadizade Huseyn Paşa di sala 1140/1727 an de Sîlsupıır şandin Rakkayê. Lê paşe, piraniya wan firsend ditibû ku birevin dora Rûm û Bozokê. Gîştik niha li Keskin, Bozok, Kirşehîr û Çîçekdaxiyê rûdinên û li ser nifûsa wan hatiye qeyd kirin. Ew li Rakka, Amed, Qereman, Aydin, Enqere, Çanqiri, Bûrsayê jî hene.060'6681 Bi piranî pey va Rûm ji bo Sêwasê bi kar tê; mezinên me digotin: rojavayê Sêwasê Rûmê.

Ji belga ku di navbera dew'leta Osmanî û êlên Kurdan hatiye çêkirin de, em êlên Yenî Î1 û gelek êlên nav hatine guhartin fêr dibin. Belge wek senet yan jî peymaneka ticarî yê, ku êlên Kurd ji bo genim ^andinê tên memûr kirin. Kovara Dîrokî wiha dibêje: Elên koçberên giiêdayî Yenî îl û

Tirkmenên Helebê bi kişandina genim hatine perpirsiyar kirin. Di sala 1048/1638 an de herdû kom hatine wezîfedar kirin ku ji Bîrecîkê genim bikişînin Bexdayê. Em ji nêzîk ve li wan cemaatana binêrin:

1- Ûlaşlû: 80 leştir û Alî weledî Bonsuz- Heleb. (,69'231) îro jî li navenda Anadolê gundekî bi navê Bumsuz heye û ew girêdayî Nasiriyan e-Reşî.

2- Bexdilî yê Kurd: 80 keştir, weledî Naşir- Heleb. (l6923l) Wekî Ûlaşlû ew jî girê-dayî Reşiyan e û îro li Anadolê çar gundên xwe hene.

3- Dimleklû: 40 hûştir, Hecî Orner, Tirkmenên Helebê. (,69'231) Ew jî Omeriyên girêdayî Reşiyan e, li Anadolê pêne gundên xwe hene.

4- Dimleklû: 30, Bekir-Heleb. (169'231) Gereg ew jî girêdayî Omeriyan bin.

5- Qadirlû: 25, Huseynê Sevîndîk-Heleb. (169'23l) Gereg ew Sêvika bin. Li Ana¬dolê girêdayî Reşiya pêne gundên xwe hene.

6- Kabali: 20, Alî-Heleb. (169"231) Gor tecrubêyên berê ew îhtîmaleka mezine ku Celikî ne. Ew jî sê gund in (hinek jî dibêjin çar in).

7- Yalvaç:15, Orner Şeh Bey- Heleb

8- Tatlû: 30, îsa- Heleb

9- Boz-Koyûnlû: 100, Pîrî Bey- Heleb

10- Doxerlû: 15, Seyf- Heleb. (169'231) Gereg ew jî Sêvikayê girêdayî Reşiya bin.

11- Abalû: 100, Muhyeddîn ê Hecî Bekir, Şamli - Heleb

12- Qere Şûxlû: 22, Huseyn bin Sevîndîk- Heleb.*169 231) Sêvika.

13- Seçen: 25, Pîr Zade Dawid- Heleb

14- Qere Hesenlû: 15, Mehmet Hecîli- Heleb

15- Çoban Bexlû: 12, Tohtemûr, Îbrahîmê Xalîd- Heleb. (169'23,) Îhtîmaleke ku ew Xelikî bin, sê gundên xwe li Anadolê hene.

16- Sekîz: 8, Gundeş-Guvendîk-Delî Şêxlî^Heleb. (169'23u Dibe ku ew Şöxbila bin.

17- Kaçar-îsa Afşar: 2, Weledî Hecî Hamza-Heleb. (169'23l) Ew Şâxbizin in.

18- Şûxler: 10, Xelîl-Aydoxmuş-Heleb yan jî tabû Qere Dîken

19- Otamişlû: 8, Hecî înal- Heleb.

'.|{,ıl - * - ✓ '

Piştî vê belge em rastîbelgeyeka din a girîng tên. Ew jî hewldana dewletê ye, ku dixwaze êlên Kurd bişîne şere Awûstûryayê. Ji bo wê li bajarê Qonyayê peymaneke bi serok û berpirsiyarên êlan re çêdikin û hemû jî binî wê îmze di¬kin. Ji bo vê A. Refik wiha radigihîne: Ji têkçûna Viyana bi şûnde, pêwîst kir ku em Tirkmenên Boz Ûlûs jî bişînin şer. Li Qonya, di hûzura Elî Paşa de, serokên hemû êlan hatin cem hev û qebûl kirin ku ji wan 300 kesî here şer. Hemûy- an pejirandin û me ew muqawele şandâ Stenbolê. Ew navên ku di kitêbê de hatine nivîsîn û kesen navên xwe li jêr soz dan: (ji Tirkmenên Danişmendî yên ku beşdarî seferê nekirin: Yenî îl, Tirkmenên Helebê, Kilîs, Reşî, Dulqa- dir, Danişmend, Mamitî, Boz Ûlûs, Badilli û yên li dora Mereş, Adana, Qers, Rakka, Payas, Mêrdîn) Cafer Beg, Abdullahê kurê Matar, Mehmedê kurê He- sen, Mehmedê Hemze Hecîli, Silêmanê kurê Keşne, Hesenê Şedîd, Çepenî Kantemîr, Armûtli Nazar Beg, Harbendelû Kurê, Koçeklû, Abdal Xelê Isa 300 lewendê sexlem û bi çêk şandin, qebûl kirin. Şahîd: Muderîs: Mehmet Efendî, Fahrulkuzat: Seyid Şûx Hesen, Qeymeqam: Abdûl Hay Efendî, Muftu Meh¬met Efendî Esînî

û Fahruêkuzat Mûstafa. Sal 1101-16883161"80' Piştî vê peymanê jî em ji fermana duyemîn dizanin ku Kurd beşdarî şer nebûne.

Cemeetên ku soz dabûn tevlî sefera Awûstûrya bibin beşdar nebûn! Ji boybeyî, cemaatên Tirkmen û ji ketxûdayên wan re! Yenî II, Tirkmenên Hele¬bê, Kilîs, Reşî, Dulqadir, Danişmend, Mamalû, Hecî Ehmed, Boz Ûlûs, Rakka; Ekradên Mereş, Edene, Qers, Payas, Bilan, Êlên li dora Mêrdînê yên Kurd û Badilî re! Bahane mebînin û şev û roj bikin yek û beşdarî artûşa li Edîrnê bibin; sala 1101-1688. (1619,)

Ji bo dagirkirina Viyana yê duyemîn û dirêj bûna şer, pêwîstiya eskeran derxist holê; ji bo sefera di 1690 an de dewletê ji Tirkmenan (Kurdên koçber) jî esker xwestin. Boz Ülûs, Tirkmenên Helebê, Yenî-îl û Dulqadir beşdarî seferê bûn, lê Salankaman xwe li ber topan negirtin (1691) û reviyan. (131'209)

KAÇAR (Bayat, Yîva, Şöxbizin-Lek)

Li ser Yîva zêde agahî tunin, li ser na\ê Yîva jî gelek cûre hene, Kaşgarli Mehmûd wiha dinivîse: Iva, Yawa, Yîva, Yava û Awa...Ji sedsala XVI an bi şûnde wek îva derbas dibû. (l31 349) Di dema Selçûqiyan de bi navê Perçem- Oxûllari derbas dibin û li dora Hemedanê (Dînaver, Kirmanşah, Hûlwan û Şehrîzor) ê dijîn. Imadeddîn Zengî ji wan komek anî Helebê. Ihtîmaleka mezine ku Yîva ji Seyhûnê bi Avşar û Salxuran ve tevhev di sala 1130 an de hatin. (13K349) Ew dîtin bi min jî rast tê; Lewra Yîva jî beşekî ji Saka, yan jî di bin navekî din de bi Saka re diketin tevgeiê. Ew li navenda Xorasanê dijîn û heta mirov dikare hîn pâş ve here û wana wek Kipçak jî bi nav bike. Nûserên Tirk Kipçakan Tirk dihesîbînin lê bi dîtina min ew ne raste. Piştê gel ji cîhê dijîn leqiyan Yîva jî bi Avşaran re hatin Loristanê. Piştre jî belav bûn û hatin Anadolê. Di sala 1158 an de Tirkmenên giiêdayî Iva Perçem li Cebelê talan kirin, Xelîfe di fermandariya

Mengû Bars de hêzek şand ser wan û gelek zirar dayê.“31 349) Ji ber wan erişen Ereban, ew jî berbi bakûrê Kurdistanê hilkişîn. Di destpêka sedsala XIII an de gelek (10 hezar siwarî) Yîvayî li Ûrmiyê bûn.fl31'352) Min di beşa Candariyan de jî qal kiribü ku ew koma li dora salên 1200 de hatine Anadolê û ew ji Xoy û Urmiyê hatibûn. Bi dîtina min ew heman êl yan jî zend e. Yanê Kurdên îro em wek Şexbizin û her tinin binav kirin in. Ew yeka ji alî Îbnî Bibi ve jî tê gotin: Di sedsala XIII an de li Anadolê jî Yîva hene û Selçûqiyan (Kiliç Arslan) ji wan esker girtine, îhtîmaleke mezine ku ew ji dora Urmiyê hatine. (131 354) Di nava Tirkmenên Helebê de jî Yîva hebûn ku heta dema Reşî bi cîh bûn beşek ji wan jî bi Reşiyan re tevhev bûn.

Lê ew beşa, piştre girêdayî Têrikan bû û îro jî li Haymana û Polatliyê bi Têrikan ve gundên xwe cîran in. C. Turkay belavbûna wan wiha dinivîse: Yîva-Yava-Yavalû Yorûge girêdayî Tabanî yê girêdayî Bozûlûs in. Li; Haymana, Mereş, Edene, Anamur, Soxutê dijîn.'160 783) Li ew cîhên hatine hejmartin giştikan jî, Şexbizinî hene.

Ela Şam Bayadi di avabûna Kacaran de rol lîst; agahiyên li ser wan ê herî kevne ji sala 1491 an vir ve ne, ku wê demê li Qerebaxa Arranê dijîn.“31' 2491 Ji vê hevokê tê fêhm kirin ku ew, pişti hatina Anadolê çûne Arranê. Di vir de rola şer, êrî§ û bi darê zorê koçkirinê heye. Ew beşa çûbûn Helebê jî pişt re berbi bakûr hatibûn. Ibê Siitanê Kaçar, Ristem Beg anî ser texte Pezgewran û piştî vê jî di sala 1493 an de erişi Gîlanê kir. Kaçar, di sedsala XVI an de ji êlên mîna: Şam Bayadi, Axca Koyûnlû, Axçalû û Yîva pêk dihat ku esasê wan êlan li Yozgatê dijîn.“31“491 Şam'-Bayatên li Bozokê jî mîna yên Iranê Sersor bûn; di sala 1578 an de kesekî ji wan îddea kir ku ew Şah Ismaîlê II an e û li Hecî Bektaş gelek kes li dora xwe kom kirin. Şam Bayadi li di sala 1613 an de hatin Anadola Navîn. (l31 250) Di wê demê de divê di nav Boz Ulûs de hatibin. Di sedsala XVI an de li

Kerkukê hinek Qaraca-Bayat hebûn. Mûnşî Muhammedê ji Bexdayê dinivîse; ku girêdayî waliyê Bexdayê Dawid Paşa (1817-1831) ji Bayatan 1000 siwarî di eskerên wî de bû; li Kirmanşahe 2000 kon, li Tavûkê jî nêzîkî 2000 konên wan hebûn. Dîroknûsê Ereb Ebbas ul-Uzzavî dibêje ew niha (1939) li Kerkukê nişstecîh in. (131251) Gor zanîna min jî beşekî ji wan niha li Kerkukê, beşekî mezin li bakûrê Kirmanşah, beşek li Xaneqînê û beşek jî li Gîlanê ne; le dibe ku hinekan cîhên xwe guhartibin.

Di belgeyên Osmanî de navê Yîva gelek derbas dibe; gor "Det'tera Tahrîra-Malatya" ew di sala 1560 an de li dora Meletiyê ne; yan jî beşekî wan li wir xuya dike. Girêdayî nehiya Qerehîsar, karye-î (gund) Yîva Ozî hatiye nivîsîn. Dîsa Mezra Koçaç, Yazi, Güllüce, Tekne Taş jî hene. Dibêje welatê xwe terk kirin û çûn zozana xwe ya bi navê Aspûzî. (9tv231i Ihtîmaleka mezine ku ew ji alî Hums û Helebê hatibûn.

Li Iranê jî Kacaran rolêka dîrokî lîstin, emê di beşa Sêxbizinan de qal bikin; lê pêwîste bê zanîn ku berî Sefawiyan, Bayat li Iranê li cîhên cûda dijîn. Ew, jî dîroka wan ê cûda dihat; ew bi navê Bayat li Hemedanê dijîn û tê nivîsîn

ku di dema Tahmasb de ew 10 hezar kon bûne. Di navbera Bayat û Loran de li Nihavend (navça Burucird) de dijminatiyek hebû. Di dema Şah Ebbas (1593) de serokê Bayat Uxûrlû Beg hate kuştin û ew dijminatî hîn zêde bû. Şah çû ser Şah-Verdiye Lor, pişti sê salan wî itaat kir û bi ser vê de Şah serokên Bayatan kuştin. (131252) Ji Bayatan Huseyn Eli Beg bû balyozê Spanya; Geda Eli Siltan bû waliyê Bakû; Yar Eli Siltan bû serokê kela li Erîvanê.031'253' Bi kurtî mirov dikare bi rihetî bibêjê ku Kaçar kalên Şexbizinen îro li Anadola Navîn, Adapazari, Edene û cîhên din dijîn in...

Wekî tê zanîn li keviya Derya Reş êla Şexbizinan heye. Gelo ew kingê çûn wir? Em baş nizanin lê dibe ku ji alî dewletê ve hatibin bi cîh kirin. Mina Orhonlû jî dibêje: Ji bo ku xelk tevlîhev bibe, "Ji Trabzonê di sala 1487 an

de eskerên xiristiyan hatin derxistin û li şûna wan ji Tokat, Samsûn, Bafra, Çorûm û Amasya xelk birin. Vê yekê ji bo rêveberiya navendî bi hêz bibe û ji bo xe- lkekî homojen pêkbînin dikirin. (9,MlW) ıhtîmaleka pir mezine ku ewên biribûn Şexbizin in.

Bûyerên demên dereng û girîng ên li Anatoliya Navîn

Li destpêka sedsala XVI an piraniyaêlên îro Anatoliya Navîn û li Anadolê dijîn bi piranî li bakûrê Kurdistanê bûn. Ji wana Canbegê-At-Çeken li Qonya; Lek-Şâxbizin jî li dora Çorûmê bûn. Orhûnlû dibêje: At-Çekenan Qonya ji xwe re kiribûn war. Ji Afyonê heta Qeyseriyê dirêj dibû. Di nav sê heiêmên îdarî de hatibû beş kirin; wana: Tûrgût, Eskîl, Baybûrt bû. Civata Izzeddîn (Oxçû- Ş) jî li dora Kilîsê bû ku tevlî Hasedsalae Walîde Siltan bûn. Yeka din ê tevê vê komê jî Reşî bûn; li Meletî diman û zivistanan diçûn Sûriyê. (9019)Tevlîbûna wan ê li Kilîsê bi kompozîyona îro li Anadolê ve hevûdu digre û heman êl li Anadolê jî hene û cîran in. Ji Îzzeddînan re Oxçû jî tê gotin; Walîde Siltan jî îhtîmaleke mezine ku Sewêdî be. Her sê civat tevhev bûne. Lekvan ^êxbizin- ş) jî li Çorûmê bûn. (9019) Wan komana û yên din tevhev hatin Anadolê bi şûnde pirsgirêk zêde dibin.

Bi cîh bûna Reşiyan ya li dora Semsûrê di sala 1560 an, li Me^ê jî 1563 an de destpêkir, ev yek ji defterên tahrîr tê fêhm kirin. Ew beşên wê demê bi cîh bûbûn, hê jî li Semsûr û navçên wê nişteclh in. Ew beşana êdî ji cîhê xwe ranebûn. Lê di serê beşê din re gelek bûyer derbas bûn. Kurdên li Kilîsê yên bi navê Şexan, Amîkî, Oxçû-Izzeddîn hema hema bicîh bûbûn û bax-baxçe û çandinî dikirin. Lê di sala 1705 an de dest bi talanê kirin. Ji ber vê yekê mal û milkên wan ji dest hatin girtin û firotin. (90'37) Elên mîna: Barak, Bayindir, Dûrsûnlû, Reşiyan li xaka Yenî îlê zozanên xwe hebûn. Lê ew çûn nav eyalata Rûm û nehiya Qereyel; xanî xelandin, zeviyên gel dan malê xwe ji bo ku ew ji zozanên xwe berê bêtir nerin

cîhekî din. Di sala 1686 an de bala eleqadaran hate kişandin. (9U'4U) Ew tê wê watê ku dewletê ew hişyar kirine, yan jî wiha tê hesabê wan, lê tiştâ tê zanîn ewe, ku piştî çend salan dewlet ê wan bişîne

Rakkayê. Di Çileya sala 1691 an de ji Beg û Ketxudayê Begdilî yê girêdayî Uskudar Walîde Siltan hasedsalai re ferman hate şandin ku wan li Akçakale (Belîh), Aynî Riz û heta Rakkayê bi cîh bike. Berê, tenê Beydilî bi cîh kirin, lê Ereban ji başûr ve erîş anîn ser. Bi ser wê ve Bayindir, Mûsacali, Lekvanikên girêdayî Uskndar Evî jî anîn.,90‘58) Elên li Yenî Ile dijîn yên bi dh dikine piraniya wan Reşî ne û di navê de Şexbizin jî hene. Lê wekî me gotî Bayindiran navê xwe dabûn Pezgewran ku ew jî îşareta kûrbûna parçebûna Kürden koçer dide nişandan.

Jinên Reşî

Reşî, êl û bavikê girêdayî wan li deşten Sûriyê bi dh bûn şûnde, di sala 1697 an de dîsa vegeriyan. Li Torosan bi Osmaniyan re şer kirin û tek çûn bi şûnde, destura çûyîna Nava Anadolê danê wan. Emê di beşen Reşiyan de qal bikin. Em dibînin ku fermana duyemîn jî di sala hicri 1141 (1729) an de ji Mûtasarifê Aksarayê, kurê Momali Osman Beg re hafiye birêkirin:

J i Qadiyên Enqere û navçên mîna Haymana, Tûrgût, Taban û cemaatên Bozûlûs Tirkmenî, Îzzettîn û Hed Ahmetî yê li Qeremanê nîştedh, Voyvoda û begên zendan re! Qerehecî yê girêdayî Mûsacalû û Yaqûbê Kose; Afşar,

Kaçar, Caber, Hecî Fatih, Neh Cemeetên Tanbûracelûyan, Ekradê Mûdan, Memavî û gelê civatên din en ku li Rakkayê hatibûn bi cîh kirin; li Rakkayê ji wan ra cîh, mal û arazî hatibûn diyarkirin, derketina dervayê wan deran hatibû qedexe kirin; zivistan û havînan li wir bi cîh bûna wan, gorî şerîate destkeftin û bi cotkariyê debara xwe derbaskirin hatibû plankirin. Ji ber çend sedeman ji wan çend cemaat ji cîhe xwe derketine. Ji êla Mûsacelû

Huseyn Kahya, serok û mezinê civatan yen ji bere ve ji hev belavbûyî kom kir û li Haymana, Tûrgûtlû û Emîrdaxê nişteciîh kirin. Dûre cemaatê boy bega, komên din, Kabaabali, civatên Dokûz (neh) derketin çûn. Cemeeta Çepniyê Kandemir li aliye Bergama, Afşar, Kaçar, Caber, Hecî Fakihî jî li aliye Haymana û Tûrgûtlûyê bi cîh bûn. Tevgera wan aşîretana derbasî êlên din jî bû û ew hewl dayina ku sîstematîk bi cîh bibin hate hilweşandin û peymana sîstema welat hate xelandin.

Ji bo êlên mîna Mûsacali (berên xwe li wir: Çil, Oşî, Kaçar, Tanbûraci, Încî, Hecîfaki û Caber) û Kantemir Çepnisî, berpirsiyarê Aydinê wezîr Abdullah Paşa xwest 103 malên Mûsaca û 87 xane ji Kantemîr Çepnisî ji sînorên Akşehîre re bêne şandin. Li herêma nêzîkî Sarikavak û Xana Husrev Paşa jî 100 xane Mûsacali hebûn û dixwestin wana rakin. Xelkê êlê jî got: "Li alî Erzirûm, Çildir, Amed û Mihalîçê komên me yen biçûk hene; heta ew hemû li cihekî kom nebin em narin cihekî din. Yekê jî em narin Rakkayê, emê şer bikin dîsa narin!" ji bo wê ferman ji waliyê Akşehîre re hate şandin ku eğer pêwîst be zorê jî bi kar bîne, sal 1729 bû. (160'806) Gor texmîna min ew jî êleka ji Lek-Şâxbizinan e.

Berên mîna Tacîr, Kiliç, Bektaşî yen girêdayî êlên koçber ên bi navê Tirkmen û Kurdler, ji bere ve li Elbîstan û Tûtarlûyê rêbirî dikirin û diçûn Alacahan, Delîklîtaş û Sêwasê û zirar didan gel. Ji bo wê ferman ji berpirsiyarê Sêwas Osman Axa re, ji serokê Reşî û Mama re û yen din re hate şandin ku rêyan bigirin û wan rêbiran jî bişînin Rakkayê, sala 1733.<lh0'809) Bi qasî em dizanin Tacîrlî Oxçû ne, lê yen din kîjan êl in nayê zanîn.

Tenê ne fermanên bicîh kirin, bi daiê zorê koçber kirin, gelek caran jî fermanên ki^tinê didan ku yek ji wana ji serokên Recepiyan re hatiye dayin. Ew jî mînakek din e ku dewletê çawa Kurd li hember Kurdan bi kar aniye. Di derbarê îdam kirina giregirên êla Recepî de: ji êl, boybegî, serok

û gelê Pehlewan re! Avşaren Recepî yen ku li Rakkayê hatibûn bi cîh kirin reviyane û li der û dorên xwe mêrîvan dikujin û talanê dikin. Tê fêhm kirin ku ev êla ji wan karên xirab ên kirî jî tobe nakin. Kuştina wan êdî vacib e! Ji bo wê, min begêbeganî Edenê Silêman Paşaya Reşî şande ser wana. Hemû belav bûn û 200 siwariyên xwe ketine nav êlên din. Ji bo wê qetiyen kes wana neparêze û îxbar bike. Ew rêbiranên Avşan? dizin, hûn xwedî şan in û girêdayî dewletê ne. Kesên ku guh nedan vê fermanê dê bêne cezakirin, sala: 1155-1742. (161'21ü)Iro jî ew polîtîka li ser Kurdan berdewam e; perê û meqam dide hinekan û dajo ser yen din.

Gor lêkolînên min, Kurdên piştî sala 1697 an hatine Anatoliya Navîn

û rojavayê Anadolê bi hatine re hema bi cîh nebûne. Di nava Anadolê de jî zivistan li cîhekî, havîn jî li cîhekî derbas dikirin. Bi taybet jî ew diçûn rojavayê Tirkiyê. Carna endamên êiêkê mirov li Derya Reş û Aydinê dibîne. Carna jî ji ber ziwabûn û xelayê ew mecbûr dibûne ku belav bibin. Ew gêra wan ji neçarî bû; lewra gel xwe bi pez xwedî dikir, eğer hişkî û şerten wan xi raw dibûn jî ew ji neçarî diçûn der û doran. Li hember vê tevgerê nerazîbûna gelên nişteciîh, dewletê û êlên din ên Kurd jî zêde dibûn. Lewra di çûyîn û hatinan de zirar did an malên gel û ji nava êlan gelek komên rê dibirî, şelandin dikî û erîşî gundan dikî jî derdiketin. Ji ber vê gelek ferman û zordarivên dewletê hebûn.

Ji bo êlên Kurdên di sala 1697 an de hatine navenda Anadolê em dibinin ku ji bo cîh kirina wan di sala 1729 an de fermanekê tê dayîn. Ji wê jî em fer dibin ku hinek êl çûne dora Qers û Erzirûmê. Ferman w'iha ye: Ji êlên ku werin bi cîh kirin re! Bedilî (Badili), Reşiyên girêdayî Ismaîl (-rêberekî êla Sêvika yè bi vî navî jî heye û koma girêdayî wî niha li Cîhanbeyliyê dijîn. Gor Necîp Şahîn ew Ismaîl di sala 1851 an de miriye, lê ew ferman di sala 1729 an de ye. Yan navê wan mîna hev in, yan jî rehmetiyê Şahîn şaşiye dike.), Ustûrikan, Kurdîkan, Hecîkir, Cemokan, Uzman, Adaman,

Zivan, Parîçkan-Acûr, Kaskan ên girêdayî Milî Kebîr, Perdel-Tacîrî, Gündeş, Kuçuk û perekende ji Rakka reviyabûn, İİ Erzirûm, Qers, Çildirê dijîn bên girtin, kesên ew pê bawer dikin wek rehine bên zîndan kirin û Rakkayê re bên şandin, ji begên Erzirûm, Qers û Çildirê re ferman hatiye derxistin. (lfi(WWR>

Di wê dema tevlîheviyê de em dibinin ku dûmahiyên zenda Qeremanî ji Mersînê têne nava Anadolê. Li ser wê Sumer wiha dinivîse: Tirkmenên ji îçelê hatibûn piranî ji zenda Qeremanî ne; İçel di dema Beyazidê Tl an de li şeş herêman hatibû parçe kirin. Lê êlên li wir hîna jî rêxistina xwe ya êlan xira nekiribûn; ji wan Bozdoxan li (Sîlîfke), Yîva (Anamur), Oxûz Han (Seiîntî, Anamûr), Bozkir (Taşlik û Sîlîfke), Bexdilî (Gulnarê), Şam (li Taşlik û Silîfkê) dijîn. Di dema Beyazîtê II an de ji Silifke û Ta§lik-Silîfkê milên girîng hatin navenda Anadolê û Qoçhîsarê. Dîsa ji wir hinek çûn Qibris û Antalyayê jî. (131‘ 200) ÿro p dora Qoçhîsarê bi piranî Reşî dijîn, ewên ku hatibûn man an neman û kîjan êl bûn em baş nizanin. Lê hinek ji wan em dizanin ku wekî berê jî me gotibû: Yîva êlên Şêxbizin in, Şamî pismamên Sêvikan in, Bexdilî Reşî yan jî dibe ku Têrikî bin jî; lewra di wata herdûyan de bi kar tê.

Afşar, Reşî û Tirkanliyan bi hev re îttîfaq dikirin. Di sala 1846 an de mutasarifê Bozok û Qeyseriyê, Celalettîn Paşa ji navendê re ragihand ku lêbirên wan 2000 xane ne. Ew ji gelê Qeza Gedîkcîkê ji 7000 zêde tir heywan d izine.'171‘235) Tirkanliyên navê xwe derbas dibe, Têrîkî ne; Afşar jî gereg Celikî bin. Dema mirov li hejmara xanan jî mêzedike, ji wê tê fêhm kirin, ku hîna jî ew bi cîh nebûne. Di hinek jêderan de, em rastî tarîxa bicîh bûna berî wê demê tên, lê mumkune ku ew nîv koçer bin. Yanê zivistanan li gundan rûdiniştin û havînan jî diçûne koçberiyê. Lewra di wê demê de êla Nasirî 125 xane ne. Vê dîtina min Hûtteroth jî dipejirîne.

Wekî me gotî, êlên hatibûn Anadolê ji ber ku debara xwe b ikin, pezên xwe xvvedî bikin û zikên xwe ter bikin carnan zirar did an gelê nişteclh. Dr. A. Saydam ji bo vvê belgeyeka gîliyan radigihîne: Di sala 1840 (1256) an de, ji êlên mina Reşî, Tirkan, Şâxbizinî yê li Aksaray, Siltanhani, Emîrgazî, Kolûkişla, Esbkeşan û İlgine zirarê dane gel û lawê muxtarê gundê Gozluyê birîndar ki¬rine û hêzên di fermandariya Xurşîd Axa de jî têk biribûn û tevlî êla Umranli bûbûn. Dîsa Lek, Afşar, Kirinti û Kûzûguden jî erîşî gel kiribûn. Hinek bûy- eiên wê deme (1848) wiha ne:

Xwediyê Giliyê Buyer

Qeza Gelemfed gelê êla Xelikan Qerebekîrê ji êla Kûzûguden bi siwariyên xwe ve û 28 Afşaran ve eriş kirine û 825 miyan dizîne.

Xelkê Paşa Çayiri-Sêwas Reşiyan 259 sewal, alavên malan, kinc û pere dizine. Ew dîsa li xwediyan hatiye vegerandin.

Di 1841 an de Mamalûyên girêdayî Reşiyen Bozok, bi qasî 24.175 quruşan mal dizîne. Dîsa li xwediyan hafine vegerandin.

Gundê Çakmak-Yildizelî Kurdên rêbir 17 hesp û 8 sewalên din dizî¬ne.

Qeza Gelemfed Gundê Bayindir Afşaran 11 hesp dizîne.

Qeza îlbey Gundê Sur-u Koncak, Xelîl 15 rêbirên Afşaran êrî§ kirine, 27 hesp dizî-ne û hespê Xelîlê şopger jî kuştine.

Hûtteroth di derdora salên 1959 an de diçe Anadoliya Navîn û li gundên wir diğere. Di heman salê de pirfûkek nivîsî ye û navê wê jî kiriye: "Di Torosên Navîn de, koçberên çiyayî û gundiyên zozanan" û çap kiriye. Gor wî nivîskarî, jiyana êlên li Anadolê yên mîna Reşî û Canbegan ên bi yen

Kurdên li rojhilatê başûrû Torosan dîjîn ve wek hev e. Dîsa gor tespîta wî, koçberiya êlên li Anadolê piştî 1870 teva bû û ew bi tevahî derbasî jiyana nişteciîhî bûn. Wê çaxê Kurdên Xelîka (Döndürme) gotiye: "Em di sala 1858 an de bi cîh bûn; Qeregedîkî di 1846 an; Bûrûnsûzşereflî 1844 an; Bûldûk-Sêvika 1853 an û Şexbizinan jî gotine sala 1800-1810 an de em bi cîh bûne. (165-22) Ew tarîxên têne dayîn hema hema ez jî rast dibînim. Tenê gundiyên Sêvika dibêjin ew di sala 1842 an de bi cîh bûne. 2000 malên ku wek rêbir têne dîtin ew Kürdana ne; mümküne ku Şexbizin di nava wê de tunebin.

Bi cîhkirina êlan ya di salên 1841-42 an de, di rojava Hikumetê de bû. Tê fêhm kirin; ku tevgera yekemîn û y a girîng, hinek komên êlên Reşiyan û Molûkan yên li gundên sencexa Bozok, wek du-sê xane hatin belavkirin. Heci- yan xwedî 147 xane û 347 serhejmara wan heye, ji Kûredaxi hatin heynan û li

gundên Haymanayê hatin belavkirin. Dîsa Têrikî yen xwedî 56 xane û 171 ser- hejmara xwe heyî li kasaba-i Zîr û Murtazaabad a Enqere hatin bi cîh kirin. Ela Taban ya xwedî 35 gund û 1230 xane li Tabanlûya girêdayî Enqere hatin bicîh kirin û pêwîst bû ku ew ji şeş mehan carekê hejmara xwe peşkeş b ikin.1171-50* Ew belav kirin, îro jî di nava gundên li navenda Anadolê de xuya dike. Derna malbat tên hejmartin mirov dibine ku hinek ji êlên din hatine û hinek jî di dûre tevlî bûne. Lê zêde kes nizane ku ji ku û çawa tevlî bûne.

Di sala 1843 an de, Sirozlu Ahmet Paşa waliyê Qonyayê bû û ji Reşiyan 1600 kesan zêdetir li Esb-i Keşan (Cihanbeyli) bi cîh kir. Lê wan di demeke kin de dîsa berbi Sêwasê firar kirin. Di sala 1848 an de tene 200 xane mabûn. Tê go- tin sedema wê jî waliyê Qonya Hesen Hakki ji wan pere, mal û hesp xwestibû. Ji evv kesen reviyabûn di sala 1847-1848 an de 517 xane dîsa bicîh kirin:

Dem

1846- 47

1847- 48

Ew belge gelek teferûatan dide me; Naşiri îro 4 gund in û serhejmara wan dikare bigihêje 20 hezaran. Sêvika jî pêne gund in û hejmara wan 15-20 hezar in. Komekûşaxû îro wek Günde Kutuga derbas dibe. C. Turkay vê êlê wek Kutukanli-Kûlûkanli û Ekradê gocerên girêdayî Mila-Kebîr nişan dide,(,ft0~ 55U)ku emjî rast dibinin. Bê gumanCelikî û kesên ji êlên din piştre tevlîbûne em hesap nakin. Umranlûyan jî Turkay wek Omeran, ekradê yoruk û nîvkoçerên girêdayî Reşiyen Mila nîşan dide.1160-7481 Omerî girêdayî Reşiyan e, lê ew hejmar ya beşekî wan e; lewra Omeriyên li Anadolê ji wê hejmarê zêdetir in. Ji bo llx- anliyan jî heman nivîskar dibêje, ew ji Mûsacalûya ne, lê min pê dernexist ku kîjan êl e.

Di bicîh kirina êlên Kurd de, dewletê her rê, ji xwe re rast didît, ji bo riyan ti pirsgirêk tunebûn, serokên êla dîl digirtin, ji gel bi zorê mal û pere diştendin û gelek rêyên din bi kar dianîn. Saydam dibêje: Vecîhî Paşa got, eğer êl ji dil werin li Ûzûnyaylayê bi cîh bibin, ezê erd bidim wan. VVî dixwest êla Haremeyn (ew gereg Cutikî bin, lewra hîna jî bi vî navî tên bilêv kirin-Ş) li wir bi cîh bike û rê li ber talana Afşaran bigire. Vecîhî Paşa çû Yozgatê û bi serokên êlan re û bi taybetî jî bi Reşiyan re peyivî. Ferman da ku heta ew bi cîh

buna pêk hat, begên êlan bikin bin çavan. Bi bicîh bûna Reşivan re, êlên din jî bi hesanı bicıh bun. Male ku elan dizîbun ji deste wan hate girtin û bi îlanê li gele hereme yı maxdur buyı hate belav kirin. Bi vı awayi ji Reşiyan 2400 kıs, ji Lek, Afşar u Kirintiyan 3000 kîs pere li kesen gilî kiribûn hate belavkirin. Ji 600 Reşiyen hatibun girtin 200 a ve tin zmdanê u 400 jî bi kefalet hafin berdan. Serokê Reşiyan 2000 akçe

teklife walî kir ku dev ji bicîhkirina wan berde, lê wı qebul nekir. Seroke Canbegan Alışan Beg ji bo bicîhkirina Reşiyan hatibû vvazıfedar kirin, lê wî jî bi zorê pere ji gel stendibû ku di lêkolîna hatî kirin de, ew rastı derket u hate tazmîn kirin.

Gundiyen Bilikan

Vital Cûinet di pirtûka xwe ya bi navê "La Turquie d' Asie" de, di derbarê Kurdên derdora Enqere de wiha dibêje: "Di nav sînorên wîlayetê de Kurdên koçer jî hene. Bi tevahî ji neh êlan pêk hafine:

1. Reşî: Bavên xwe hinek ev in: Misin, Quaranî, Xelikan, Şilikiyan û hwd.
2. Şexbizin: Xorasanî, Heyvedanî, Leranî, Jirdikiyan û Nosalanî.
3. Badilî
4. Têrikî
5. Mikaîlî
6. Cambegî: Gurekî, Derweşanî, Tûzonanî, Topîşaxî û Toîkiyanî
7. Seîfanî (Sêvika).
8. Koyîbanî: Alîkiyanî, Nafkiyanî
9. Atînanî: Gêzeranî, Celikanî, Dawûdan û Elîasanî (min rast nivisî).'174"79'

Mirov nizane ku Vital ew nava ji devê gel an ji jêderên din girtine, lewra mirov ji bilî Xelika nizane ku êlên girêdayî Reşiyan yen din kîjan in. Di nava êlên Şexbizinî de jî navê êla Xorasanî balkeşe û ew jî îspateke ku ji wir hatine. Dîsa navê Leran jî bi vî awayî ye, ku heta vir min gelek caran qal kir. Em nizanin Alîkiyanî û yên din jî kîjan in, lê li ser êla Alikanê agahiyeka wiha heye ku ne diyare ew herdû yekin, an na? Alikanê (di navbera Sêrt-Qozlix û Mû§-Kurtikê de terin û tên) koçber ji 8 qebîlan pêk tê: Cûdikan,

Çengovan, Ozigan, Necîman, Mehman, Birîvan, Şehîdan û Şeheven (gereg Şahseven be¬Ş) in. (167'76) Elên li Anadoliya Navîn ên girêdayî Reşiyan yek jî Cûdigan-Cûtikan e; îhtîmaleke ku bi êla di nava Alikan ve yek bin. Yek ji Birîvan e ku li Xorasan jî gelek beiên Birîvanê hene û ji alî ziman, civak û rûhî de wek yên Anadolê ne.

Dr. Abdullah Saydam niqteyeka balkûş tîne ziman, ji bo ku mentalîta dîroknûsê Tirk bê fêhm kirin girînge ku em li ser rawestin: T^tê bala me kişand; êlên li Anadoliya Navîn di salên 1839-1853 an de bi cîh bûne nêzîkî 40 000 kes in û bi piranî di qeydên dewletê de ew wek "ekrad" hatine nivîsîn. Mirov vana hemûyan Kurd bihesibîne şaş e, lewra em ji sedî sed dizanin ku ew Afşar, Lek, Kirinti, Reyhan, Kûzûguden Tirkinen in. Ew jî tê wê watê ku Osmaniyan zêde girîngiyê nedidane etnîsîtê. (171'255) Ji vê şirovê em fêr dibin ku serhejmara Kurdên li wê herêmê bi cîh bûyî 40 hezar kes bûne, ew girînge. Mirov dikare ji wir nifûsa nû jî hesab bike. Wek mînak: Sêvika wê demê 143 xane ne (gundê Bûldûk di 1940 an de texmînî 100 xane, îro jî ew ji 1000 xaneyan zêdetir e), di her xanekê de em 6 neferan hesab bikin dibe 858 kes. Iro jî serhejmara wan nêzîkî 18 hezaran e; yanê 21 caran pir bûne. 40 hezar jî 21 caran pir bibe dibe 840 hezar kes. Di dûre jî kesên tevlî bûne mirov hesab bike dibe yek milyon. Saydam, gor qeydan tevnagere û dibêje: Afşar, Lek, Kirinti, Reyhanlû, Kûzûguden Tirkmen in. Ew êl û zendên ku hejmartin Şûxbizin, Celikî û Kurmancên din in. Ew jî ispateke ku çawa navê Kurdan guhartine.

Di heman demê de li bakûrê Kurdistanê jî hinek parçê êlên li Anadolêye ji alî Beyazidî ve hatine ragihandin. Di salên 1850-56 an de rewşenbîre Kurd Mela Mehmûd Beyazîdî wiha dinivîsîne: " Êlên ku li Aleşkerdî (Eleşgirt) û li gundên wê dijîn ev in:

Memtî 400 xane

Banokî 50 xane

Bilincanî 50 xane

Berazî 150 xane

Millî 50 xane

Dilkî 50 xane

Mankî 50 xane

Şadı 100 xane

Hor kî 100 xane

Twazlî 50 xane

Mirdîsî 60 xane

Siwêdî 70 xane ne.

Dîsa yen li Wane yen ku bi navê Ekradan tên nasîn û girêdayî Şikakan in û axayê vvanî her dem jî ji mala Hemze Begê e êlê xwe ev in:

Herwiha êlên li Arnedê û derdora wê jî wiha radigihîne:

Millî 4000 xane

Qere Çorî 3000 xane

Badilî2000 xane

Reşî 6000 xane

Lork 8000 xane

Sîlwî 4000 xane. (177-1)

Êlên girêdayî Milan bi piranî di qeydên dewletê de vvek Sîl-Supuren derbas dibe; ew ji mêraniya wan dihatiye ku cîhên derbas dibin hemûyan reş dikirine û kesî nedikarive li hember bisekine. Ewe li dora Keskînê bi cîh kirine.

Sîl-Supurên ji Cerîdan jî li 12 gundên Keskînê bi cîh bûne, li mile Cerîd î esasî li gundên Cerîda biçûk û ya mezin a girêdayî navça Çaxlayan Cerîda li Mereşê bi cîh bûbûn. Sîl-Supuren li Rakkayê mêraniyeka mezin nîşan dan. Avşar jî li Sariz û Zamantiyê bi cîh bûn. Lê bê şensiya mezin ewe, ku zozanên wan dane mihacirên ji Qefqasya hatibûn. (131'216) Avşar îro jî li wê herêmê dijîn û ji wê re Tapkiran-Sine Milî tê gotin.

REŞÎ

Tarif kirina Reşiyan gelek zorê, ji ber ku ew koma cama û li hinek cihan federasyon, li hinek cîh û deman konfederasyon û li hinek deman jî mirîtî û devvlet e. Mirov dikare wekî pûzelê jî bi nav bike; li hinek cîh û deman êl ketina navê û piştre derketine; jihev veqetiyane û gor şerten deme şikl û navaroka wê tê guhartin. Ji bo wê jî wêneyekî ji wê komê yê safî dayîn pir zehmete.

Li ser wata navê Reşî Hoko dibêje: Reş=mezin; Reşemêreke=mêrekî mezin; pirtûka pîroz a Ezdîtiye=Mishefareş û Çiloyê (=Huzwareş). (32) Reşiya di nava pirtûka pîroz de derbas dibe jî bi ditina min ji vê konfederasyonê tê. Li ser nav li derdora Semsûrê di nava gel de tê gotin ku ji ri§andinê tê, lê ti girêdana wan bihev re tune. Wekî me di beşên derbasbûyî de jî gote, di dema Xorriyan de navê Çûxreşiyan, piştre di dema Medan de Reşan, pa§ê jî Eba Reşan, Kum Reşane hene û dibe ku ew nava ji cilên reş ên li xwe dikin jî girtibin. Ev alternatîfa yekemîn e. Ya duyemîn jî ev e, ku ji mêraniyê-egîtiyê hatibe wergirtin. Heta roja îro di nav Kurdên li Anadola Navîn de gotinek heye û dema yekî karekî mêranî kir ji vê re dibêjin: "Qeremanî Reşo!" yan jî "Şöre Reşo!" xuyaye ku têkiliya xwe bi merxasiyê re heye. Yekê jî di nav civak û jêderan de gelek cûreyên wî navî hene, wek: Reşwan, Rişwanlû, Rişî û hwd; mirov dikare 50 navî bi wî rengî bijmêre, lê ya rast Reşî-yan e. Ew navên din hemû ji alî gelên biyanî û dewletên dagirker ve hatiye dayîn.

Navê Reşiyan û êlên girêdayî Reşiyan mirov dikare li erdnîgareka gelek fireh rast were. Ew yeka jî bi pêvajove dîroka ew tê re derbasbûne ve girêdayî ye. Wî navî mirov dikare li Afganistan, Xorasan-Iran, Gîlan-ïran, Qefqasya, Erzirûm, Qerâ, Dêrsîm, Meletî, Semsûr, Dîlok, Germiyan, Kilîs, Heleb, Hama, Humus, Lazqiyê; navenda Anadol û gelek bajarên li Anadolê bibîne. Eger mirov cîhên êlên girêdayî Reşiyan jî bijmêre, divê mirov bi hezaran cîh û war binivîse.

Beiê jî min nivîsîbû, ku Reşî parçeyek ji Xorriyan e; piştre em wana di nava Saka de (bi gotineka din Saka Reşî bi xwe ne) û alîkariya bi Medan re dibînin. Li ser girêdana Saka, mêjiyê dîroka Tirkan C. Turkay dibêje: Cemeeta Rûmiyan-Rûmiyanli SAKA Yûsûfê ji êla Reşiyan e. Ew li: Sîwerek, Semsûr, Nîzîp, Bîrecîk, Rakka, Dîlok, Erzirûm, Qers, Çildir, Ahiska, Sêwas, Meletî, Tokat, Qereman û Aydinê dijîn. (160'637) Ew nav ne tesadüfe; heta vir jî me gelek caran têkiliya Reşî û Sakan car caran îşaret pê kiribû. Rûmiyanli berî Tirk werin Anadolê hatibûn dora Sêwasê, piştre jî çûbûn Iranê û hîna jî li Xorasanê ew bi vî navî hene, Kurmanc û Reşî ne. Rişwanoglû jî şiroveyeka gelek ba^ş dike: Gelek êl ji Hindîkûş, çiyayên Elbrûzê di welatê Goran re derbasbûn û hatin Kurdistanê. Di nava wan de Reşiyên ku bûne Tacik û şaxekî Saka ne jî hene. Zekî V. Togan jî dibêje: Reşan/Roşan Sakayên koçber in. (128 149) Bi rastî lêkolînên min jî didin xuyakirin ku têkiliya Tacik û Reşiyan-Kurdan yê nêzîk heye; lê ji bo wê pêdiviya lêkolînên zêde û serbixwe hene. Hêvîdarim kesek wî

Em dizanin ku Reşî di nava dewleta Şadı de hebûn, le hela dema Moxolan û piştî wan navê Reşî zêde dernakeve peş; navê elan li peş e. Ji bo wê mirov cama dipirse, gelo Reşî piştî zext û zora Moxol û Tirkan bun konfederasyon? Yanê li hember erişen wan neçar man ku hêza xwe bigihînin hev? Ew alternatîfa jî heye; lê pêdiviya îspatê zêde heye. Hinek

jeder dibêjin: Dema desthilatdariya Dulqadiran (sedsala XÏÏT an) li Mereş-Elbîstane xwestin sînorên xwe fireh bikin, bi êlên der dore ve ketin şer. Bi vî awayî bi Atma, Çakal, Begdilî, Kabalar û bi milên din ên Reşiyan ve her tim di şer de bûn. Elan gelek zirar dîtin û nikarîn herin zozanan. Lê mirov dibîne ku Reşî di nava Dulqadiriyan de jî hene. Mümküne piştî wan şeran ew jî ketibin nav.

Gor Şerefname dinivîse Reşiyen wê demê li dora Eleskîfê bûne. Navê wî bajarî jî "Re's el-Qule" derbas dibe. Gelo wata wê ne Kela Reşan e? Ji rîwayetan tê neqil kirin ku di sala 1264 an de, li Misr û Şamb, dawî li desthilata Eyyûbî hat û revvşeka wan ê xwe li ser piya bigire nema. Zarokekî ji vê xanedanê xwe li Hemayê veşart; piştre çû Mêrdînê. Lê nikarî li wir bimîne û berê xwe de Re's el-Qulê-Heskîfê. Sêzdeh êlên girîng li Kela Reşan hene: Aştî, Mihalbî, Mîhranî, Becnewî, Şeqaqî, Îstûrkî, Kurdlî Mezin û a Biçûk, Reşan, Kişkî, Cilkî, Xendeqî, Suhanî û Bidyan.tl57191) Ji vê agahiya girîng em dizanin ku Reşî li wir hebûne. Dûre em dizanin ku li wir Celikî û Reşî ji hev cûda têne hejmartin. Dîsa Bidyan-Biyan jî em dizanin ku Oxçû ne. Hinek dîroknûs van êlana di bin sîwana Reşiyan de kom dikin, lê bi dîtina min ew ne raste. Dibe ku mirov û xismên hev bin û mil dabin hev, lê ne yek federasyon e. Dikare bibe konfedarasyon. Xaldî, Dêrmexarî û Izzeddîn-Ezîzan jî êlên Kela Reş bûn, lê li Sason rûdiniştin.11''7'2251 Hesenê Dirêj Kela Reşiyan girt bi şûnde; Melîk Xelîlê xwe li Hemayê weşartî, vegeriya û bi alîkariya Mihemmedê Şbrwanî Sêrt heyna û bi riya aştiye jî Kela Reşiyan rizgar kir. (,57 195) Mirov dikare ji wê bûyerê jî xismatiya Eyyûbiyan û Reşiyan an jî êlên Kela Reşiyan bibine. Paşâ, dema Şah İsmail hate welatê wî, ew bi xwîşka Şah re zewicû Piştî demekê jî wexta bi Şah re îtaata xwe diyar kirin, li Tebrîzê ew girtin avêtin zîndanê. Yek ji wana Melîk Xelîl bû, ew fermandarê hatî teslîm kirin jî Zeynel Begê Şamlû bû. Dema Melîk di zîndanê de bû, êla Şervvan, Zirkan

û yên din li hev kiribûn û Melîk Silêmanê kurê Melîk Xelîl ji bo fermanrewatiya xwe hilbijartibun. Lê êla Reşan tevlî vê hevkariya han nebûbû û pismamekî Melîk ji bo serokatiya xwe helbijartibûn. (157 iy5> Wê demê Zerikî di nava wê konfedarasyonê de ne, lê xuyaye ku piştî wê bûyerê ew yekîtiya wan belav dibe. Piştî wê bûyerê jî gelek caran em dibînin ku ew federasyon ne li cîhên cûda bin jî benda hev bernedane û hevkariyê kirine.

Ji hatina Tirkan û Moxolan bi şûnde, gelek êlên girêdayî Reşiyan (Rûmiyan) çûn Iran û Arranê. Hinekan jî di bin navê mîrîtiyên li Anadolê de jiyana xwe berdewam kirin. Piştî ewên li rojavayê Anadolê hatin bakûrê Kurdistanê em dibînin ku ji Reşiyan beşekî li dora Meletî û Semsûrê ye. Di sala 1516 an de Yawûz Selim erîşî rojavayê bakûrê Kurdistanê dike. Meletî û

Doxanşehîre di sala 1519 an de begliga Besniyê (Girêdayî eyelata Mereşe) ye kete destê Tirkan. Serokatiya sencaxê Alî Beg hat û Meletî bi Besniyê re hate girêdan. Di vê demê de êla herî mezin Reşî ne û Atmali bi Çakalli ve girêdayî wan ve Doxanşehîr û der dorê ve wek welatê xwe bi kar dianîn. Gor hejmartina serhejmara di sala 156Ü an de ji bac stendinê li Meletî û gundên wê hatî kirin de; serhejmar wiha ye: 26 navçe, 672 gundên xwe hebûne û bi gîştî 31.148 kes li vê herêmê dijiyan (Deftera Tahrîra Dema Kanûnî). (,5) Bê guman berî wê demê gelek Kurd li hemberî erişen Osmaniyan goç kiribûn. bien Reşiyan sedsala XVI an li sancexa Meletiyê war girtin û zivistanan jî diçûn çolên Sûriyê!90"191 Wê demê hîna berbi bakûr nediçûn.

Gundiyên Reşî

Ji defterên wê demê ve mayî te fêhm kirin, ku beşek ji Reşiyan di sala 1560 an de li Kahta-Turus, Paginikê, Kozkenar, Hartût, Încîrlûyê bi cîh bûne û çandiniyê dikirine. Dîsa li günde Tiginkar-Kahta aşe Hemze Axa hebûye!176' 44) Berê jî min gotibû ku ew Reşî hîna jî yen nîştecîh in. Dîsa di sala 1563 an de Reşiyen di nava eyaleta Mereşâ de bi cîh bûne û çandiniyê dikirine!176"441

Li ser wê xalê di deftera Tahrîra Meletî de wiha tê nivîsîn: "Girêdayî Kaza-î Kalıta; mezraî Kozkenar, Hartût, Incîrlû Reşî lê çandiniyê dikin. (97'337) Girêdayî Nehiya û Qaza Kahta Teroş jî mezra Alî Taş, Tûralî Bûrcî, Çakal, Keferkeros, Babek, Akpinar, Kûyûcak, Kepîrlî, Tahnalû jî Reşiyan çandinî dikirin. (y7413) Qeza Semsûrê günde Mermer û mezrayên mîna Meşhedî û Kargilyuce; mezra înablûca ya günde Koprullu; gundê Geranî, Hosterî Kuçuk, Gûyez, Exdîr, Taşbûdak, Nûman jî hinek ji vvan ind176jW) Li wir nav lênana gundê Meşhedî girînge, ew jî delîla vê ye ku ew ji Xorasanê hatine. Dîsa di deftera Tahrîr a Meletî de: Mezra Veranî, Bilviranî(97'430)yê hen e ku li Xorasanê jî ew n a vana hîn li ser êlên Kurd hene. Ji bo wê hatine, me li dora Semsûr û Kolikê lêkolîn kir û ji şêniyên wir pirskir ka kengê û çawa hatine; sê ditin derketin hole:

1- Osman Yücel (Ji gundê Kilîsk û ji êla Çelebi): Di dema Selçûqiyan-Ertûx- rCıl Beg de ji Iranê hatine. Reşî bi hev re hatine û li Torosên li dora Kolikê bi cîh bûne...

2- Galip Dede (Ji êla Xidirsoran): Reşî ji Xorasanê hatin. Kîngê em nizanin, ew êla xwe Tirkmen dizane û Elewî ne.

3- Eli Fatkimê (Ji Kolikê): Reşî di sala 1700 an de ji îranê hatin û li Kolik, Enqere, Qonya, Kirşehîre bi cîh bûn. Reşiyen eslî ji herêma Enqere hatin. Ji van herse ditinan ya yekemin hîn bi giranî tê qebûl kirin. Bi dîtina min di her goti- nekê de rastiyek heye: Rastiya yekemin ew ji Xorasanê û di dema Selçûqiyan de hatine. Xwe Tirkmen zanîn jî me gelek qal kir.. Ji

Enqere hatin jî raste; mîrî- tiyên (Germiyan, Qereman...) li rojavayê Anadolê wan Kürdana damezirand û ji wir vegerîn Kurdistanê.

Yrd. Doç. Faruk Söylemez radigihîne, ku di sedsala XVI an de Reşiyan li Kahtayê zivistan derbas dikirin, havînan jî diçûn nehiya Subadra û gundê Surguya Besnİye. Li Sürgüye derbendekî me- zin heye ku Reşiyan riya vî gundî bi kardianîn. Iro li zozana navçeya Surgu ya li D o x a n şe hî r ~ M e 1 e t i yê nav û şopa vê êlê hîna jî heye. (176-43) Çima nediçûne Sûriyê em nizanin, bi dîtina min nivîskar di vir de şaşitiye dike, eğer ne wiha be sedemeke wan digire divê hebe ku li Kolikê zivistan derbas bikin. Di hi¬nek defteran de, şûna navê Reşiyan pir caran Asvan jî derbas dibe. Wek mînak, wiha derbas dibe: Ka- ryaî (gund) Zernî tabî êla Asvan çandiniyê dikin.{97‘

405}

Hemû belge û jêder nîşan didin ku di sed¬sala XVI an de Reşî li dora Semsûr, Mereşe dijîn û zivistanan jî ew diçûnê Sûriyê; di vê yekê de guman û şik nîne. Bê guman komkujiyên Seiîm û serhil- danên Celalî- Reşiyan jî bûn sedama gelek koçberî,

dh guhartin û bi darê zorê bi cîh kirinê. Di heman demê de Reşî jî wek gelek êlên din parçe bûn; êl û federasyonên di navê de hatin guhartin.

Beşek jî dîsa çû Xorasanê. Berê jî me got, jİ komkujiya Reşî û êlên din ya di sala 1578 an de Muratê III ferman derxistibû û Hoko, ji çavkaniyê xwe radigihîne (Reşvvendiyan) di sala 1601 an de ji Anadolê hatine derxistin. Ew li Kilîşim, Laye, Kakostan, Behramabad, Kiya Kelaye, Hesenabadê û li bajarê Siyahgul û Şardirmen dijîn. Ola vvan Dawidî ye. (32) Ew Reçiyên li wir, yanê li Gîlanê min dîtin, di nava çiyayên başûre Derya Kesk de dijîn. Lê gor K. Tewahûddî ew piştre şandine wir. Piştî wê tevlîheviyê em dibinin ku beşekî ji Reşiyan, bi taybet yen nîştecîh li herêmên xwe bûne

desthilatdar. Di heman demê de ew tê wê watê ku ew bi Osmaniyan ve li hevkirine û bi awayek otonom jiyane.

Reşiyen li Gîlanê

Ji bo wê N. Sakoglû navê gelek began dinivîse: Begên Besniyê (1650¬1850) ji Reşiyan in û 200 salî li ser Mereş, Meletî û Besniyê xwedî gotin bûn. Ji vê komê gelek Mîrê mîran derketin, ew: Xelîl Paşa, Omer Paşa, Mehmet Paşa, Silêman Paşa, Abdurrahman Paşa, Omer II. Paşa, Abdurrahman IT Paşa ne. Dewletê nediwêrî ji derve birêvebir ji wan re bişine. Mînaka herî baş Begê Besni ye, baca sê salan komkirî ku 123 hezar kuriş bûn û jê kurişek ji dewletê re neşand. Ew jî hêz û qudreta wan dide xuyakirin. Koma Reşî di vê herêmê de şelandin jî dikir. Tewerê gelek caran qenterên dewletê yen ji Bexda dihatin

û karmendên dewletê jî dişelandin. Dewletê nediwêrî nêzîkî Reşiya bide û jê re çavê xwe digirtin. Wek mînaka di sala 1750 an de pêk hatî: Silêman Paşaye Reşîzade bi 2000 siwarî çû Darendeya dervayê sînorên wan, çar rojan ma, ji gel êm, xwarin bê perê stend û ji gundan gelek xugî civand.

Li Elbîstanê jî tişten bi vî rengi kirin. Li ser gelek giliyan, dewlet mecbûr ma here ser Reşiyan. Arteşeka gelek mezin di navê de top jî heyî şand ser Reşiyan. Arteşe biryargeha xwe li gundê Çixlika girêdayî Doxanşehîre ava kir, kemin ji leşkere Kurd re danî, top bi kar anîn û Kurd têk birin. Eşîret belav bû, kon û malên wan hemû hate talan kirin û careke din natin. Dewletê nediwêrî ji derve birêvebir ji wê konfederasyone re bişine. (12913) Bi ser wrê de şaîrekî ji gel wiha gotiye:

Sen Rişvanoglûsun bûlûnmaz narhin Tu küre Reşiyayî, bi gelek nirx î-Tu nayê kirin Aşiklar oldurur verdiğin vergin Baca tu didî evîndaran dikuje

Altında arap atin elinde kargin Di bin te de hespê Ereb, di deste te de mertal

Kollarinda çingirakli bazlar de döşer Di bazken tê de hazin jî hene.{m~U)

Reşî-Taxa Jor a Pinarbaşi-Kolik

Nadir Şah di dema paseyê Osmanî Ahmetê TIT an de erîşî ser Bexda (1732) kir û heta ber deriyê Bexdayê çû. Begêbeganî Erzirûm Osman Paşa bi arteşeke çû ser Nadir Şah. Osman, hêzeka di bin emrê Rişvanzade Mehmet Paşa de şande Mûsilê. Ji vir jî çû ser Bexdayê, arteşa Nadir têk bir û Bexda

rizgar kir. Nadir bi ser vê, erişi Tiflisê (1734) kir û şeş hezar Kurd jî di parastina bajêr de cîh digirtin. (51) Bi vî awayî em dibinin ku mir û beşek ji hêzen Reşiyan gelek caran li kêleka arteşa Osmaniyan çûne şeran û bi wan re alîkarî kirine. Li hember vê jî li herêma ku lê dijîn mîrîtiya xwe otonom birêve dibirine. Bi hêza dewletê ya li pişt jî, ew gelek zilm û zextan li gelê xwe û yen dran dikirine.

Di vê demê de h inek jeder qala zilma Reşiyan ya li ser gelê hetêmê kirine dinivîsîn. Wek mînak: Li gundê Kirlangiç navê jinekê bi xeravî der tê. Şahînoglû, Begê Besniyê yê Baliyan birêve dibe diçe gundê Kirlangiç. Vê jinê girê dide û tîne ser kaniyê li darekê dardixe. Meha Tebaxê ye û jinik çend heftan li dar dimîne û terme wê genî dibe. Ji bînê kes nikare di rê re derbas bibe, ji tirsa Şahînoglû jî kes nikare ji darê deyne û paşê jê rica dikin û dadixin. Di sala 1838 an de nexwaşiya ku jê re "Mittika Romê" digotin (kolêra) der tê û bi hezaran mirov dimirin. Bê guman ew bûyerên wiha di dîrokê de hatine qeyd kirin, divê yen bi vî rengî yên nehatine qeydkirin jî pir bin.

Ji ber serhejmara zêde û hêza Reçiyên nîştecîh di dema Osmaniyan de herdem otonom dijîn û ew yeka ji alî gelek nûserên ve tê pejirandin. Mereş û Meletî tim di destê wan de bû ne. Yên koçber jî, ji Rakkaya hetanî Sêwasê bi heywanan re mijul dibûn û dijîn. Gelek êl û tîrên xwe hebûn. Cîhên têde derbas dibûn xirav dikirin û ji bo wan Derbent (koricitî) hatin avakirin. Di dema paçayê Osmanî Mûradê IV an de (1648-1687) fermanek di sala 1677 an de ji bo 800 kesên ji Reşiyen di bin fermandariya Rişvanzade Ibrâhîm Beg yên li Semsûr û gundên wê de bi zorê rûniştin derket. Ferman derket ku ji cîhê lê nîştecîh rabin û li gundê Sixnazê girêdayî Besniyê bi cîh kirin. (39 90)

Sîstema Osmaniyan li ser êlên Kurd wek zilmekî dihate meşandin; ji êlan esker dihate girtin û ew careka din li mala xwe venedigerîn; dîsa ji êlên Kurd zêdetir bac dihate stendin û dixwestin mesrefên dewletê yên giran ji ser milên Kurdan derxin. Ew yeka li gorî demê jî dihate guhartin, yanê dema êl- Kurd bi hêz û dewlet jî lewaz dibû qet bac jê nedistend, ku me li jor mînaka 123 kurişan dabû. Kata dewlet bi hêz û Kurd lewaz dibûn jî du qat ji Kurdan dištendin. E w jî dibû sedama nerazîbûn û serhildanan. Ji Reşiyen li navça Hizn-i Mansûr (Semsûr), ji sala 1685 an vir ve, sê sal in ji baca di defterê de hatî diyarkirin zêdetir: ji salê 2507 qûriş mehane, bi navê "zamîme" ji 150.000 pezan, ji bo her 100 pezî jî 60,5 qûriş xarcirah, xer ji wê ji 100 pezî bi navê dalya 1-2 pezên ji bo has voyvodasi hatine stendin. (90'41) Eşkereye ku barekî girane û Kurd xwe nadin ber ve yekê. Ji bo wê di sala 1686 an de Reşiyan seri hildan û gor hin belgeyan, serkeçê vê Qere Mehmûd Rişvan e. Ji Osmaniyan Catêr Paşa ew serhildana mezin têk bir û di stranekê de em dizanin ku ew ji Rakka ye û jina xwe jî keça Toraman bûye. Carekê erîşî kela Tokê jî dike û dibêjin koka wî ya ji bavê Reşiy§n li Divrixî ye. Ihtîmaleka mezine ku ew ji Dalyanlûyan e. Di sala

1690 an de îdam dikin. Hevalên xwe jî Qere Xelîl û Bayindir Halît bûne. (I29'50)

Navên serokan balkeş in; Bayindir êla ku navê xwe daye Pezgewran

ku min qal kiribû. Ji bo Reşî wê demê konfederasyoneka gelek mezine, di her firsênde de seri hildida û dewletê jî dema xwe bi hêz didît û Kurd jî lewaz didîtin erîşî wan dikir. Bi vî awî Osmanî bi Reşiyan ve, mirov dikare bibêje ji salên 1500 heta 1800 an di nava tekoşînâ de bûne. Di dema wê tekoşîne de gelek êlên Kurdên ku dixwazin xwe biparêzin jî li dora Reşiyan kom dibûn û ji bo wê mirov nikare Reşiyan di qalibekî ke. Mirov dikare bibêje wê demê ew konfederasyon bûn; lê dikare wek mîrîtiyeka nîvkoçer jî bê tarît kirin...

Doç. Söylemez ji defterên Osmanî radigihîne ku di sedsala XVI an de Reşî li Meletî û Mereşê diçûn zozan û germiyanan. Wê demê hejmara êlên girêdayî wan 15 bûn, paşê ew êla mezin bû û heta Rûmeliyê belav bû.<l764)Di defterên Tahrîr de êlên Reşiyan wiha rêz dibin:

Rastnivîs (S):

1. Hecî Orner Cemeetî (Cematî Ahmed veledî H. Orner)-Kaytanî Omerî-Qeytanî
2. Xizir Soranî Xizir Sora
3. Kellelû —
4. Celikanlû Celikî
5. Mûlûkanlû Molikî
6. Mendûbalî (Mendollû) Mendolî
7. Zerûkanlû Zerikî
8. Boxraşî Boxreşî
9. Rûmiyan Rûmiyan

10. Mansûr Mansûr

A

11. Izdeganlu Izdegan

12. Mansûrganlû Mansûrî

13. Karlû —

14. Rişvan Reşî

15. Çakallû Çakal

Ev wêne konfederasyonekî nîşanî me dide; êlên mîna Zerikî, Izdegan, Çakal, Mendolî em nasdikin û bi yên din ve êlên nêzîkî Reşiyan in, lê piranî serbixwe ne jî. Demên di navhev de derbaskirin qerekter, devoka wan nêzîkî hev bûne; lê bi ferqên pir hindik mirov dizane ku ew êl û federasyonên cûda ne. Di xebateka li ser vê niqtê de mirov dikare bi hêsanî wan cûdahiyana tespît bike... Di roja îro de H. Orner, Molikiyên li Qonya girêdayî Reşiyan in; Celikan hinek dikin nav hinek nakin. Lê ji bo ku berê girêdayî Reşiyan bûne mirov gereg wan jî wek Reşî hesab bike. Zerikiyên li Qonya, Enqere, Sêwas û Xorasanê cûda ne. Izdeganiyên li Xorasanê jî serbixwe ne. Ew êl yan jî federasyon li Xorasanê hîna jî bi wan navana dijîn. Yanî wek: Izdeganlû, Rişwanli, Zirkanlû derbas dibin. Bi kurtî ew tablo ji êla Reşiyan zêdetir wek konfederasyonekî xuya dike. Heman nivîskar dibêje: Ji qeydên wan salan bi şûnde em dibinin ku êlên mîna: Bereketlî, Bektaşli, Belikanli, Benamli, Cûdikanli, Dalyanli, Dimişkli, Heycebanlû, Hidiranli, Hoşnîşîn, Mahyanli, Nasirli, Okçûyan,

Sevini, Sinkanli, Şexbalanli u Terziyanli ji di nav de hene. Bi rû wan de ji

Reşiyan Hamıdlu û Hacîlar hene ku li gelek cîhên Anadol û Rûmeliye günden

bi navi van hene. (176'4l)

Ji gundê Sêvika Mehm û Meda Erîf bi zarokên xwe re

Iro li Anadoliya Navîn êlên girêdayî Reşiyan ew e ku me reş kiri (rast nivîs: Berkatî, Bilika, Cûtika, Naşiri, Mifika, Sêvika, Şex-Bilan) bi yen mina Ornera, Molika, Oxciyan(Mahyan-Mihîna?), Xelika, Celika yê li jor ve me tevî kiriye hene û hejmara wan digihîje 12 êlan. Heciban girêdayî Milan in li dora Kizilirmak (Bala) xwedî gelek gundanê. Ev tablo li jor li Semsûrê tê guhartin û yen li cîhên din ên Anadolê jî haya me jê tune ne. Wek Hamîdliyê girêdayî Reşiyan li günden Malkara, Akçekîzanlik, Edîrne, Sarûhan-Kirkaxaç, Izmîr û Qastamonûyê hene. (176'45) Ihtîmaleka mezine ku ew hatine helandin.

Celika

Di sala 1784 an de Reşiyan, li nêzîkî Alacahanê qadiyê Bexda şelandin û meriyên wî kuştin. Ji bo wê ji waliyê Sêwasê re hate nivîsîn ku wan bigirin. Pişti salekê, li Alacahanê li karwana Îzmîrê xistin. Melûkanliyên (Molikî) girêdayî Reşiyan û li Akçadaxa Madenê rûdinên tezmînatê xwestin. (129'63)

Iro li Semsûr-Kolikê tê gotin ku 12 êlên girêdayî Reşiyan hene; le kesek nikare wana hemûyan bijmêre. Ji gelek hevditinan bi şûnde encama me derx- istî ew êl in:

1- Çelebî-Gund: Kilîsk, Hopak, Berwîdol, Bûtbax, Elût, Bersomik, Sako û hwd...

2- Teşik-Gund: Kergurak, Çerxenek, Çavçûk, Qelan, Berazî, Kefirme û Der¬ben.

3- Qerçor/Qerçol-Gund: Aksû, Alancik, Kiran, Serinde, Yarpûzlû, Qerekosc, Arikonak, Narli...Bala we bikşînim ku ew nava bi yê li ser kevirê Yenîsey ve yek e...

4- Alikan-Gund: Çamdere, Huseynlî, Dilektepe, Hesenlî ne.

5- Xidirsor-Gund: Koçalî, Recep, Aktaş, Çalxan, Kûrûdere, Pinarbaşi, Koseûçaxi, Bistigan, Abdulharap, Çamgazî, Bolgenek in. Li vê herême jî rûspî dibêjin Reşî 12 êl in, lê kesî nikarî hemûyan bijmêre.

6- Mamrek (Elewî).

7- Mansir (Elewî). Li Xorasanê jî hene.

8- Geller (jêr û Jor).

9- Mihican.

10- Taşil/Tişil.

11- Kaw (Tê gotin ku: Sêvikî, Nasirî, Omerî, Bexikî, Bilikî, Mifikî, Biraketî û Xelikî berê girêdayî Kawiyan bûne...).

12- Gomik. Li Xorasanê jî hene.

Wekî xuya dike ti nêzîkbûna navan bi yen li Anadolê re nîne. Lê sîstema wan wekî me di beşa Celaliyan de jî gote mîna va Celaliyan e. Ew jî du beş bûn ku heryek ji 12 êlan pêk dihat. Reşiyen li Anadolê û Semsûrê jî ji 12 êlan pêk tên. Sine Milî 12 êl in, Atma 12 êl in. Li Xorasanê jî sîstema wan bi tevahî cûda ye. Lê gelek ji wan êlana li Xorasanê jî hene. Li Semsûrê êl wekî sîstema sedsala XVI an, yanî wekî 15 federasyonên me li jor ragihandî ye.

Reşiyen Elewî yen ti Kolikê

Gora M.Zekî êlêka bi navê:

1. Etmanîkan ê li dora Derben, Bedlîs û havînan jî li alî Mûşe heye û serhejmara wan 5 hezar malbat in. Nêzîkî Enqere rûdinên, lê hejmar negotiye. (19 l89>Şaxön Atma ev in: Tilki, Kizir, Haydar, Keti, Sadaka, Kizkapan, Qerehesenan, Qere, Axca, Tûrûç, Kaba, Mahkan. (12fM98)

Etmanîkan 5000 mal in. Pir caran li alî Bedlîs û Botan tên dîtin. Havînan diçin Mûşe û koçber in. (10M77)

2. Belikan 7000 mal nîşan dide û Zazakî diaxifin.

3. Reşî li başûre Erzirûmê dijîn û 7000 mal in.aiMÖ5)

4. Berkatî: 10.000 mal in li başûre Kirşehîre û nêzîkî Kizilirmakê rûdinên. (I9'18S)

5. Taburoglû: Bakûrê Kirşehîre û 300 malbat in û nîvkoçer in.

6. Cûtikan: Li başûre Qoçhîsarê rûdinên, 200 mal in û nîvkoçer in.

7. Xelikan: Ji herêma Kalîfanî ya Rewandûz hatine, 400 malbat in.

8. Sêfkanî: Li bakûrê Xalikan rûdinên û 500 malbat in.

9. Nasirî: 700 malbat in, li başûre Enqere, Qerealî rûdinên.

10. Mahasî û Umranli yê Milan jî, li Kirşehîre rûdinên, tevhev 1100 mal;n (19-189)

Umranli di jêderên din de wek Omeran derbas dibe; di hinek cihan de jî wek êlêka girêdayî Canbegan xuya dike. Lê ez li Bilikiyên bi ziravê Kirmanckî deng dikin rast nehatim. Ew êlên hatine nivîsîn, xêr ji Atma îro li Anadolê girêdayî Reşiyan xuya dikin. Lê girêdana Atma ya bi Reşiyan re tam ne zelal e. Belê herdû jî di heman pêvajoya dîrokî re derbas bûne, heri kêm xism û meriyên hev in û di praktîkê de ew gelek dikevina nava hev. Hîna jî êla mîna Atmiyan, Çeqelan, Xelka (ava Şîro), Delika-Celika, Bîstîka, Omerî (Ahû Dere), Sêvika, Bilikî (Gurlevîk), Nasûrliya (Şîro) li Meletî hene. Doç. Eroz dibêje: Wekî tê fêhm kirin Reşî konfederasyon e, Atma jî girêdayî Reşiyan e. 50 sal berê (1920) li Bala û Haymanaye di nava Kurmancan de Reşî jî hebûn û wek mile: Şix Pojîn, Togal i, Mîkaîl, Rişvan, Her katli dihatin beş kirin. Elen Atma 12 ne: Tilkî (Hesena, Bikler, Tono), Kiziri, Heyderî, Ketî, Sadaka, Kizkapanî, Qerehesen, Qere, Axca, Tûrûçî,

Kaba, Mahkanî ne. Tilkî bi eslê xwe Tirkên ku Kurmancî deng dikin e ne, dema ji Asya Navîn hatin, li Loristanê di bandora Farsî de man û zimanekî tevlîhev deng dikini99'431

Reşiyen li belda Omera ya girêdayî Konya

Me di rûpelên derbasbûyî de jî ew dîtina eşkere kiribû û wekî Kocadax ji "Dîroka Wanê" radigihîne: Ela bi navê Atma tê gotin ku ew êla berê li bakûr û bakûrê rojhilatê Derya Kesk dijîn û zemanekî pir kevn de ew hatina dora Silêmanî; ji wir jî beşekî bi riya Midyat, Stewr, Mêrdîn, Amed û Qulpê çûne Bedlîs û Araratê. Hinek ji wan li dora Bedlîsê dimînin ji ber ku gayê wan westi-

yane ji re gotine "Gawestiyan". Beşek jî tere Qastamonû û Antakya yê. (17_198)]i gundê Hesen Elî yê girêdayî Elbîstanê, Hesen Elî Gurarslan wiha dibêje: 400 sal berê ji ber zilma Osmaniyan em reviyan ser Akdax-Nûrhaq; paşe em dake¬tin jêr le gundê me sê caran kavil kirin. Gundî me û dora wî, li Göksün, Avşîn, Nûrhaq û Elbîstanê Atma, Sinemîllî û Alxas dijîn. Piranî Elewî ne, lê hinek pişt re bûne sunnî. Berê, jinên me zebûnên bi sê çeqan li xwe dikirin, kofi didan serê wxe, keçikan bi zêr û pîlikan ew dixemilandin. Ela me ji dîrokeka nayê zanîn de ji Xorasanê hatiye Xorasana Erzirûmê û paçê jî ew hatine Semsûr, Meletî, Mereş, Qeyserî û Anadoliya Navîn.

Rişwanoglû li ser Reşiyan wiha dinivîse: Reşî konfederasyon e, ji çiyayê Kurmenc heta Enqere, Bala, Haymana belav dibin. Herî zêde li Mereş, Dîlok û İslahiye têne dîtin. Atma û Sinemilî yen di nava Reşiyan de ne. Xêr ji wana berên Reşiyan: Şix Pojîn, Togal, Mikaîl, Rişvan û Berkatî ne. Di nava Reşiyen Mereşe de em Çixilan jî dibînin. Dîsa di navbera Araban û Besniyê de em dibî- nin ku Çepnî jî di nava Reşiyan de ne. Beşekî xwe bi

Kurmancî, beşek jî bi tirkî deng dikin; mirîden Hecî Bektaşî Welî yen yekemin in. Cara yekemîn di sala 1277 de li Sînopê bi cîh dibin. (l2^147) Nivîskar, Atma û Sinemiliyan dike nava Reşiyan; di alî ziman, rûhiyatî û tevgera rojane de, endamên herdû koman gelek nêzîkî Reşiyan in; lê bi dîtina min ew federasyon bi Reşiyan ve mil dane hev in, îttîfaq û yekîtî pêk anîne. Mikaîla jî di nava Reşiyan de dide xuyakirin, lê ew piştre tevlî Reşiya bûn û bi eslê xwe ne Reşî ne. Xala herî balkeş jî yen wek mirîden H. Bektaşî nîşan dide ku ew jî ji Xorasanê hatibû Anadolê û îhtî- maleka mezine ku Kurd bû. Hejmara tîrên Reşiyan wiha dide xuyakirin:

Rişvan, Kizilirmak û çiyayê İlgaz.

Axe Reşiyan, herêma Alacana Sêwasê, Sencaxa Meletî, Sokûllu.

Reşiyan: Mereş, Rakka û Yozgat.

Kürden Reşî: Hisni Mansûr, Besnî

Reşiyan: Qastamonû, Çanqiri

Irişvan: Qeyserî, Edene, Bîrecîk, Şam, Kilîs, Dîlok, Rakka

Azîzan: Edene, Edene-Sîs.

Reşiyen Berekat: Edene, Semsûr û Meletî

Birsan: Semsûr û sencaxa Meletî

Bezikî/Bazîkî: Rakka Rûmkale, Meletî, Riha, Sîw^erek, Amed, Mereş, Erzirûm.

Cûdûkan: Adiyaman, Meletî, Bozok û Sêwas

Reşiyen Dimişk: Kilîs, Meletî, Heleb.

Ekradê Heciyan: Hisni Mansûr, Meletî, Mereş, Qeyserî, Haymana, îçel-Anamûr, Yozgat.

Reşiyen Hecî Omeran: Mereş, Kilîs û Dîlok.

Xidiran: Heleb, Semsûr û Kilîs

Hadder: Meletî, Kilîs, Besnî, Heleb

Hamit Kebîr: Hisni Mansûr, Kilîs, Dîlok, Edene û Tarsûs.

Xalikan: Nîxde, Rakka, Erzirûm, Kangal.

Xiziran: Besnî, Meletî, Adana, İçel.

Hosnişîn: (Koçber-Ekrad) Mûsil-Kerkuk, Semsûr.

Qelerli (Koçer-Ekrad): Semsûr, Exin, Arapkir, Erxanî, Meletî, Akçadax, Kurecîk û li Dîlok û Kilîsê jî bi cîh bûne.

Koseyan Ekradi: Semsûr û Meletî bi cîh bûne.

Mandan-Mandol (Koçer-Ekrad): Bîrecîk, Kilîs, Dîlok, Arapgîr, Mereş, Rûmkale, Edene, Heleb

Mikadan (Koçer, Ekrad): Besni, Meletî, Bala, Haymana

Mûllûkan û Oba Hecî Bekir (Koçer, Ekrad): Divrixi, Meletî, Bozok.

Omahyan (Koçer,Ekrad): Li Enqere û Sêwasê bi cîh bûne.

Rûmiyan (Koçer,Ekrad): Sevverek, Amid, Semsûr, Nîzîp, Firat (Bîrecîk), Rakka, Erzirûm, Qers-Çildir

Sevirli (Koçer,Ekrad): Semsûr, Meletî, Rakka, Mereş.

Senek/Sinkan (Koçer,Ekrad): Erxanî, Qers, Çildir, Rakka, Sêwas.

Terziyan/Derziyan: Semsûr, Şerqî Qerehisar.

Umran/Umranli Ekradi: Meletî, Amed, Mereş, Bîrecîk, Mêrdîn, Kilîs û İçel (Mût)

Zerikanlû (Koçer,Ekrad): Kahta, Aksaray,Mereş, Rakka, Mêrdîn, Hi- nis, Agirî

Ji wan eşîreten li jor hemûyan re Reşî tê gotin. (39)

Ekrem Izî nivîskarê herêmî yê ji Kolikê, wiha beş dike: Tîrên xwe yen serekî ev in: Atma, Sinemîllî, Mikaîla, Şihpojîn, Togal û Herkat in. VVana jî di nava xwe de ji êlên cüda pêk tên. (,2114l) Xuyayê ku bi Rişwanoxli vê heman fe- derasyonan dijmêre û koma ku ew terîf dike jî konfederasyon e. Wek mînak Atma 12 êl in: Tilkî, Kizir Haydar, Ketî, Sadak, Kizkapan, Qerehesen, Qere, Axca, Turuş, Kaba, Mahkan. Kiziroglû Mûstafa heye ku bi 150 hevalên xwe yen Kurd ve rêbirî dikir. Reşî ji êlan pêk tê. Di salnama Mamûret-ûl Azîz de, berên êla Zûrevkan a girêdayî Reşiyan wiha tên rêz kirin: Alikan, Teşikan, Gel¬ler û Qereçor.1'21 m) Di nava Atma de jî em rastî 12 êlan tên, ku ew hejmara ji bo wan hemû êlan bingehîn e...

C. Turkay jî wênekî cüda dide: Hacaban, Halikan û Omahyan êlên Reşiyan in; civatên xwe jî ev in: Azîz (Kütahya, Edirne, Adana, Rakka), Bektaş, Benam, Berekat (Adana, Nîxde), Birsan, Bizikî, Cûdikan, Dalyan, Dimişkî, Hacaban, Hecîyan, Hecîomer, Hadran-Xidiran, Hadrasûr, Hamîdî-Kebîr, Hamîdî-Saxir, Hoşnîşîn, Qeler, Koseyan, Mahman, Mandalî ne. (160) Ewên me reşkirî em dizanin; lê yen din me tam dernexistin. Koseyan bi min balkeş tê; bi dîtina min ew ji xanedana Kose Paşa tên û şaxekî Reşiyan e. Iro jî gereg ew di nava Omeriya-Omahyan de bin. Bi vî awî herkesek wêneyekî jî Reşiyan dide û herkesek tabloyekî cierdixe holê û piraniya wan jî rast in. Lewra me di dest- pêkê de jî gotibû, ku wê konfederasyonê mirov nikare bi hêsanî safî bike. Li deverna mezin li deverna biçûk e û formatekî wê ya sabît nîne.

Resî-Gundê Bervidol-Kolik

Avcioglû jî hinekan cûdatir û mezintir dike: Ji wan re di wata "Konfe¬derasyona Eşîran" de digotifi Reşî û ji wan êlan pêk dihatin: Reyhan, Barak, Qereçêx, Kûzûguden, Ilbex, Mîllî, Ümran, Kangun, Şefaat, Cihanbax, Namû, Avşar, Qeleçorlû. Kurmaç, Atma, Kiliç jî girêdayî vê

konfederasyonê bûn. Çepnî di nav Reşiyan de bûn. (24) Milan bi xwe konfederasyone, Canbeg gereg federasyon be û ne di nava Reşiyan de ne. Nivîskar di wê babetê de şaşitî dike. Reyhanli li deşta Amîkê li ser daxwaza wan, di sala 1721 an de bi cîh kirin. Reyhanli 2000 xane û 12 êl bûn. (90'109) N. Şahhuseyinoglû dibêje: Beren Reşiya gelek in, hinek ji wan ev in: Kaba, Qere, Qerehesen, Mahman, Horan, Atma, Mahîhan, îzol û Çakalî ne.<l3'25)

Me li jor gotibû ku li hember mesrefên dewletê yen giran, karmendên dewletê yen diz pişta gel şikandin û pere bi navê " İm d a dise f e ri y e" yê di sala 1686 an de ji gel kom kirin bû merhala dawî. Reşî û êlên din ên Kurd li hember dewletê serî rakirin. Dewletê ew serhildana jî vemirand û di sala 1691 an de ji bo gel hîn baştir bidoşin fermana bi cîh kirine derxistin. Bi wê armancê gelek Tirk anîn li aliyê Riha û Dîlokê bi cîh kirin. Li aliye din jî dixwestin êlên Kurd jî li sînorên dewletê yen bi xeter bi cîh bikin. Ji wana yek jî sînorên bi bedewi- yên-Ereb re bû. Ji bo ku ew venegerin, Kurd li hember Kurdan wek koruciyan bi kar anîn. Ji bo ku êlên Kurd, bila derbasî Elbistan û Meletiyê nebin, vazîfa "Derbentçî-Bekçî "dan gelê Besnî û Goynukê yen girêdayî êlên Kupelî Hesen û Xelil Beg.

Ji fermanê şunda jî Reşiyan dewletê guhdarî nekirin, zeviyên gel çeran-din, komên şelandine avakirin û koçberiya xwe dom kirin. Bi ser vê de, Osma- niyan ji waliyê Riha û Sêwasê re ferman şandin ku bila herin ser Reşiyan. Reşî û êlên din ên Kurd di sala 1691 an de bi zorê şandin Rakkayê.

Bi rîh kirina Kurdan cara yekemin ji bo Reşiyan fikirîn; ji bo vê, ji Rakkayê heta Sêwasê heft herêm tespît kirin:

Rakka: Ji ava Rakka heta Firat û li bakûr heta Akçakale (berê cîhê Reşiyan yê zivistanê bû)

Samasat: Li bakûr Samsat, li başûr Bozova, Haran, Payamli û Akçakale (cîhê zivistanê).

Navbera Iskenderûn û Firata li Suriyê (zivistanan dihatin wir)

Li bakûr Antakya, li başûr Humus (êlên Ereb dixwestin li wir bi cîh bibin) Edene, Iskenderûn û Mereş

Amasya, Tokat, Sêwas, Sûngûrlû, Yozgat, Çanqiri û Enqere.

Reşiyen li Suriyê hatin bi cîh kirin, di sala 1697 an de vegeriyan û xwe avêtin Çiyayên Torosan. Mufetişû Anadolê Yûsûf Paşaçû ser êlên Kurd. Kurdan bi 5000 xane û 15.000 kesan ve xwe avêtibû Torosan û Çiyayê Gavvir. Yûsûf Paşa ji wan re xebereka wiha şand: "Padişah qetî emir daye, hunê mecbur vegerin Rakkayê, eğer hun neçin emê we bikujin! " Kurdan jî ev bersiv da ne: "Ji heywanên me re giya tune, gelek jê mirin, gelek zarok û mirovên me can dan. Em nikarin herin Rakkayê! Bila padişah cîhekî din nîşanî me bide, yan jî em dikarin herin Menbîçê, eğer cîh nede emê heta mirovê xwe yê dawiyê şer bikin! ji bo ku herin Menbîçê 25 roj mühlet dane. Lê xebar şandin ku ew ne diçin Menbîç ne jî Rakkayê. Çar-pênc gundên Azaz, Dîlok û Helebê rûxandin. Casûsên Yûsûf Paşa xeber anîn ku xwarina wan teva bûye, bi giya xwarinê çavê hemûyan perçifîne... Ji paşayû Osmanî re 2500 siwarî, 40 tabûr pêya û gelek esker ji êlên Kurd jî hatibûn. Paşa derbasî tevgerê bû. Koma di bin serokatiya Hecî Mûstafa û Hecî ivaz Ogûllari aman xwest û teslîmî Paşa bûn û vegera Rakka qebûl kirin. Di wê navberê de: Kethûdayên waliyên Heleb û Sayda, cîgirê bege beganê Trablûs-Şam, begê Tirkmenên Reşî; Rişvanoglû Xelîl Beg, Şahîn Begê Il-beylî, Ibrâhîm Begê Kovûnoglû, Çobanoglû, Kurd Kiliçli, êlên Bektaş Beg û ji gelên Kilîs, Azaz, Antep, Meletî 10.000 kesên bi tifing û weqas jî bi rem û eskerên waliyê Edenê li deşta Amîk tevlî Paşa bûn. Pehlewan-oglû Ismaîl Beg bi 10.000 siwarî û piyade ve geliyê Arslanli girtin. Paşa ji Antakya hate pira Mûrad Paşa. Elên Kurd bi 1100 kesî êrîşî

paşa kirin lê têk çûn û reviyan. Elên li Aktepê bûn. Paşa dixwest wana ji holê rake. Ji ber wê êlan mektûp şandin û lêborîn xwestin. Ji bo ku careka din wî karî nekin efû bûn; paşû Osmanî xeftan li serokên wan kir, dane ber xwe û birin cîhê îskanê. (9092> Osmaniyan 30 serokên êlan kuştin. Bi ser vê de jî rê nedan ku herin Kurdistanê, lê Anadoliya Navîn li ber wan bû ku jê re bibe welatêkî nû. Ji defterên wê demê manî de tê fêhm kirin, ku li Dîlokê cîhekî bi navê "Kabir Gedîxî" yan jî "Reşî Gedîxî" heye ku wata wê goristana Reşiyan e. Ji gundê Sêvikan Reşoye Hemê (1907-2006) dema çû Çûkûrovayê li ser riya Torosan: "Ew geliyê li wir ji seriyên Reşiyan tijî kirin! " digot, ku ew gotin ji kalên xwe bihîstibû...Reşiyên li Kurdistanê mabûn yên girêdayî Begê Besniyê bûn. Di navbera salên 1750-1770 an de ji Semsûiê heta Sêwasê dagir kirin.

Pişti vî şerî jî gelek êlên Kurd x wes tin xwe bavêjin nava Reşiyan û bi vî awayî şopa xwe ji ber dewletê bid in winda kirin. Lê dew let jî heta dawî kete dû wan û heta ji dest hat li Suriye bi cîh kirin. Ji bo wan êlên hatibûn nav Reşiyan ferman hatin derxistin. Yek ji wana wiha ye: Ji waliyê Rakka Huseyn Paşa re! Tirkmenên ku min ferman derxistî ku li Rakkayê bi cîh bibin, firar kirine û hafine nav Reşiyan. Wana îskanê qebûl nekirine. Ji te re ew fermana min e, ku tu wan derxî û li ciyê wan bi cîh bikî! Sal 1103-1700. (16M24) Di heman salê de Giriziyên girêdayî Reşiyen li Kilise cîhê xwe terk kirin û hatin günden Taşeliye li sencaxa Meletî. Iddea kirin ku di destên wan de ferman heye. Xelkê wan gundana derxistin. Ji memûrê bacê re gotine: "Em Reşî ne û baca xwe didin" lê derket hole ku ew bac jî nedane. Piştre soz dan û tahûd kirin ku ew xirabî nakin û ji ber wê di wan gundana de man. Lê di sala 1714 an de wan dîsa dest bi xirabiyan kirin û bi ser vê de dîsa hate hewldan ku wan bişînin Kilise.056*79)

Reşiyen di sala 1560 an de bi cîh bûbûn, em dibinin ku pişti salên 1650 an, ew rutba paşatiye digirin, ew jî tê wê watê; ku yen nişteclh dikevine xiz- meta dewletê. Encama vê yekê wekî me li jor jî qal kiribû dewletê ew li dijî Reşiyûn koçer, di şere li dijî Iranê û li hember Kurdên din jî bi kar anîn. Heman tevgerê em li hember Kurdên koçber jî dibinin. Bi vî awayî parçên heman êlê li

hember hev jî bi kar anîne. Ji waliyê Heleb, Dîlok û Boybegê Reşî re hukim!

Dedeşlû û Selmanliyê li Mereşe nîştecîh, ji salê 1855,5 qurişbac didan... Revvîs- te hûn îttîfaqê bikin û wana li alî Helebê bi cîh bikin, sal: 1139-1726. (161169) Ji bo ku êl li Heleb Alaca Xanê bi cîh bibin fermanek hatiye derxistin û kopiyeka wê ji berpirsiyarê sencexa Meletî Mehmet Paşaye Rişvanzade re jî hatiye şandin, sal: 1146-1733. (lhl l95) Fermanek jî ji bo talana êlên Avci û Afşar, ji bo begêbeganî Mereşö Silêman Paşaye Rişvanzade re hatiye biiêkirin, sal: 1147-1734. (161‘200) Di sala 1155-1742 an de begêbeganî Edenê jî Silêman Paşaye Rişvanzade ye. (16,-209) Bi wî şiklî her ku Kurd ketin xizmeta dewletê, ew jî sînorên desthilatdariya wan fireh kirin. Bi wê riyê bi kevirekî li çend çûkan dixistin. Gor wê dorpêçê jî Reşî nediketin bin kontrolê.

Li alî Mêrdînê konfederasyona bi navê Milan dihate naskirin dijî, Milan bi Reşiyan ve gelek caran tevlîhev bûne, hinek êl li nava herdû koman belav bûne û li ser çanda hev gelek bandorê kirine. Mirov nikare ji hev cûda bike û ji gelek aliyan ve wek hev in. Lê mixabin dijmin ew jî li hember hev bi kar anîne. Serokê Milan ya wê demê Tîmûr Paşa bû. Mirovekî li Stenbolê perwerdê bûyî, liserxwe û bi hêz bû. Waliyê Heleb û Amedê yê wê demê ji Tîmûr Paşa ditir- sin lewre ew aliyê Amed, Heleb, Mûsilê girêdayî xerecê kiribû. Bi erê kirina Siltan, waliyê Bexdayê Silêman Paşa di sala 1791 an de erîşeka mezin anî ser Milan. Silêman Paşa cîranê Milan

yê ku qet ti carî bi tenê nikare wana têk bibe; her tim alîkarî stend û 30 leşkerî zêde tevlî artâşa xwe kir. Evên ku tevlî bûn jî, waliyê Helebê Koca Mûstafa Paşa û waliyê Meletî Reşvanzade Omer Paşa bûn. Teymûr Paşa nikarî li hember wan bisekine û reviya Helebê. Gelek Kurd hatin kuştin. Teymûr paşa di sala 1800 an de bû birêvebirê Rakkayê, di sala 1803 an de jî bû waliyê Sêwasê. (26) Alexis Kuylenstîerna ku gerokekî Swêdî ye û li başûr û rojavayê Kurdistanê geriyaye dibêje: " Kurd di nava serhildanan û Ereb jî li hemberî dewletê di şerekî vekirî de bûn. Hafiz Paşa gor her zahmetî, tekoşîn li hember hemû dijminên xwe bi lind kir. Eskerên Hafiz bi dizîka bi çiyan ve hildikişiyan û dijmin dişevvitandin. Paşû, serokên êlan yek di dû yekî dikirî û êlêk li hember ya din dikire şer. Di dawî de bû fermandarê Kurdistan û Mezopotamyayê. Lê li hember Misiriyan şer winda kir û Sûriyê jî di destê Îbrahîm Paşayû Kurd de bû. (188‘21) Bi vî awayî dewletê Reşiyen nîştecîh, yan yên desthilatdariya Tirkan pejirandî wek maşeyeke desta li gorî dilê xwe bikar dianî. Beşek ji Reşiyan jî nediketin bin kontrolê.

Elên girêdayî Reşiyen ku nediketine dest, di salên 1750-1770 an de ji zozan û cîhên xwe yên zivistanê yên kevn derketin ji Semsûrê heta Sêwasê gelek gund talan kirin. Ji êla Sêvika ya girêdayî Reşiyan, Milê Hemî Kur (1898-1996) li ser koçberiya wê demê ji min re kilamek striya:

Hawar hawar Zewa min hawar!

Saltî li Zewê mini ber bi kaw e (ji vir mirov fêhm dike ku di cîhê pişkovatı de kaw hene)

Ezê xêr ji Elê xwe giya bi q urban kim

Dnka Memê minê ku mayi li bini Mereşe salle ber bi kaw e.

Ji we êlê mêrê male Çolo, jina xwe li binê Mereşe dide erdê û vê kilamê li ser dibêje. Ew' jî nişan dide ku wê demê jî ew diçûnê Mereş û

Kurdistanê. Bi ser terk kirina Reşiyan ji cîh û zozanên xwe de Qadiyê Divrîxiyê ji Stenbolê re nivîsî. Bi ser wê de gelek ferman ji waliyên herêmê re hatin şandin ku wTana dîsa bişînin Kakkayê. Ji bo çûyîna zozanan jî bilî ji Besnî û Semsûrê wir de, destur nedin ku bila derbas bibind129-40* Cewdet Paşaye ku nijada xwe ji Balkanan e û destê xwe heta ber di nava xwîna Kurdan de, li ser Reşiyan wiha dinivîsîne: Elên Reşî, malên dewletên nedidan, zilim li gel dikirin, riya bazirganan dibirîn û roj bi roj talan û rêbirî zêde dikirin; tewerê berê karwanekê Izmîrê ji holê rakiribûn. Qadiyê Bexdayê kuştibûn û rê hemû girtibûn. Eger wana bi vî awayî berdewam bikira, Anadolû dê xirab bibûya. Padişah, qetî qerar dabû, ku guhên wan bikişîne û ceza bide, li cîhekî bi cîh bike û têke bin kontrole. Ji bo wê ji gelek begêbegan û walivan re ferman hatin şandin. Ew êlana bi marîfeta waliyê Rakka wezîr Kekî Abdı Paşa û mîrêmîran Orner Paşaye Reşî li deşta Ereban hatin bi cîh kirin. Şerten amana wan ev bûn: Zirare nedin gelê dor û ber; deynên xwe ji sala 1198/ (1785 yan jî 1782) an de manî bidin Orner Beg û ji bo karwana Izmîrê jî 1500 kîse akçe dayîn bû. (162'671) Ew nivîs tirsa dewletê ya ji Reşiyan eşkere dike; bi rastî dema êlên Kurd diketine tevgerê, rewsa dewletê û ewlakariya wê xirav dibû. Heman jêder dibêje: Di sala 1812 an de sêlandineka balkeş pêk hat: li Sînorê Sêwas, li herêma Delîktaş memûrên dewleta Ira ne ji alî Reşiyan ve hatin şûlandin. Bi qasî 9250 quriş mal girtibûn. Serkeşû vî karî jî Moroglû Hesen û hevalên xwe bu. Tê fêhm kirin ku Reşî hîn koçber in û li zozan û cîhên zivistanê rûdinênd129'1441 Ew R eşi yên ku rê li karinenden Iranê girtine, dê piştî çend dehsalan li navenda Anadolê bêne bi cîh kirin. Reşiyen li bajarê Edenê jî di nava liv û tevgerê de bûn. Reşiyen li Edenê ber bi ber belav bûbûn û her yekî cîhek zebt kiribû. Cama serî hildidan û riya hecê digirtin. Dewletê cama dest li mil dixist û carna jî ew berdidan hevûdû û bi kevirekî li dû çûçikan dixist. Di sala 1200 an de jî

Reşî belav kirin, lê ew reviyan çiyan û dewletê jî dora wan girt. Xelîl Begê Reşî reviya ser çiyayê bi berf.{lh2'851) Kalê wî Xelîl Begê Reşî jî di sala 1697 an de, bi hêzên dewletê re erîşî birayê xwe dikir û niha jî dewuan hatibû guhartin û ew bûbû hedefa heman dijminî...

Reşiyen li dora Edenê, yên ku me li jor qal kiribû bi yên Anadolê ve çend girêdanên xwe yên girîng hene û hinek êlên parçe bûne li herdû herêman dijîn. Yalman li ser wan lêkolîn kiriye û dixw'aze wek Tirk nişan û îspat bike, lê hewldaneka ne raste. Di heman demê de em jê fêr dibin; ku li Torosan, gundên Berkatî, Omerî û Mihmanli hene. Berkatî 80 sal berê (teqrîben 1840) ji Yozgat-Mecîdiye hatine û 60 kon in. Omeran jî li wê demê hatine û 50 kon in. Mihmanli ji Elbîstanê hatine. Oxçû jî ji Çîçekdaxi hatine û hindik în.<106 108) Bi vî awî em dibînin ku êl çawa fireh-belav û parçe bûne. Sakaoglû, girêdaneka din ê dîrokî bi me dide xuyakirin, dibêje: Ewên ji êlên xwe vêqetiyabûn û çiya ji xwe re war girtî re digotin "Akçadaxli". Hevalên wan êlên ji Reşiyan veqetiy^an wek: Şamali, Gurne, Kurecîk, Kerûşaxi, Leventoglû bûn. Ji êlên

girêdayî Reşiyan wek: Mandalı, Hamûlî, Çelganî, Rûmanî (Rûmyan), Turkanî jî, li biharê ji dora Riha û Semsûrê derdiketin û dihatin Akçadax û di navbera wan de şer derdiket.tl29~l56) Ew êlên wekî Kurecîkan hatin hejmartin, îro li dora Meletî dijîn û qerektera wan di her alî jiyanê de wek Reşiyen li cîhên din in. Min gelek hewl da ku li ser wan agahiyên berfireh di nava vê pirtûkêkim lê mixabin rêvebirê komelên wan alîkarî nekirin.

Berî ku em derbasî çîroka belavbûna Sevika-Reşiyan bibin pêwîste em taybetmendiyeka Reşiyan binin ziman. Heman demê ji alî Sakaoglû ve tê ragihandin ku ew jî ji bo veguherîna koma Reşiyan girîng e. Nivîskar dibêje: Reşiyan berê yek boybegekî-mîremîrakî xwe hebû, lê çend sal in, 1763, ew ji hole rabûye û herkes azade. (l2940) Tê wê watê ku heta wê demê konfederasyona Reşî yekîtiya û rêxistiniya xwe parastiye û ji wê

katê bi şunde, ew yekbûna xwe dawî ji dest herd a ne. Ew tarîxa ji bo veguhartina wan ê rêxistinî mîladekexirab e. Piştî vê demê jî dîroka belav bûn, yan jî herkesi li çara serê xwe geriyaye dest pê kiriye...

F w sîstema belav bûnê, di gotina mezinê me rehmetiyê Ibrâhîm Şahine ji êla Sêvikî, gêra bavanê xwe qal dikî de jî xuya dike û ew di heman demê de wek secera Sêvikan ya demê dereng e jî: Bave wan Kawas Axa di sala 1765 an de dimire. Lawê wî Nûrî li cîhê bavê xwe rûdinê û bavê xwe li goristana bi navê Avcilar a Govdelî ya girêdayî Xarpûtê vedişere. Wek bavê xwe, wek serokê êla xwe li navça Semsûrê ya girêdayî Meletiyê li zozanên beriyê di konê xwe de jiyaye. Zivistanan jî li Gövdeliye, di quntara çiyayekî de çend metre ji erdê dikole û konê xwe li ser vedigire, bi xwe û bi heywanên ve têde dijîn. Nûrî Axa, ji zenda Berazî ya girêdayî Semsûrê, ji êla Ziravkî, bi jineka pir hezdikî re cara duyemîn dizewice. Sênîka ji dema wî (1737) ve ma ye, li cem neviyê wî yê heftan Ibrâhîm Şahîn e. Nûrî Axa, texmînî di sala 1797 an de mir. Ahmet Axa jî wek wî di nava sînorên Elezîz û Xarpûtê de jiyana êla xwe berdewam kir. Di sala 1824 an de Ahmet Axa jî mir û li cîhê wî Sari Ismaîl rûnişt. Ismaîl, termê bavî xwe jî bir Govdeliyê veşart. Sari Ismaîl sê zarokên xwe hebûn: Yek Molla Ibrâhîm, Hecî Huseyn (Molla Mehmet û Mûstafa jî lawê xwe ne) û Hecî Osman bûn. Sari Ismaîl, serokatiya 1700kesên Sêvikî dikir. Ismaîl Axa, havînê li Ozûn Yaylê, zivistanan jî li Haymana li gundê Çalış derbas dikirin. (156"8) Li gundê Tirko û Xabûra yê girêdayî Haymanayê du komên ji goristanên kevn hene. Gelê herêmê wan wek goristanên "Gundê Buldix-Sêvika" bi nav dike. Gor hevpeyvînên min bi kalan re kirî, ew gorana ji dema berî nîştecîh bûnê ve mane. Dibe ku ew ji wê dema ku rehmetî dinivîsî de mabin. Ismaîl Axa di sala 1851 an de mir û li nehiya Mecidiye ya girêdayî Kamanê binerd kirin. Melle Ibrâhîm dema li alî Kamanê koçber bûn, hikumetê dawetê (emir) bicîh bûnê kir. Beşek ji êlê

ew qebûl nekir; lê Melle Ibrâhîm qebûl kir û li cîhê gundê Beşkardeşê bi cîh bû. Ew kaniya li wî gundî û ya li Gundê Qerê Fakili-Boxazliyan jî, ji bo xêra diya xwe çêkir. Li ser mermer wiha nivîsî: "Sahîbul Hayrat, vel hasanat" Melle, di fermana hikumetê ya duyemîn de hat

li Gundî Omê bi cîh bû. (158'3) Gelek dîtin hene ku ew gund di sala 1800 an de hatiye avakirin. Dewleta Osmanî di sala 1842 an de biryareke wergirt, ku dh guhartina êlan tê qedexe kirin. Yen ku bi dilê xweş ew biryara nepejirandin re rêva bi dilê reş (darê zorê) jî vekirîbû. Yen ku bi dh dibûn re jî erd dihate tanzim kirin. Bi vî awî komên mina: Yenî II, Reşî, Reyhan li, Avşar li Amasya, Sêwas, Qonya û Qeyseriyê bi cîh kirin. Li ser hate rawestandin ku; ji vana Reşî û Avsarên serhejmara xwe zêde ne, belav hatin bi cîh kirin. (156‘8) Bi rastî di praktîkê de jî xuya ye, ku piştî wê biryarê bicîh kirina êlan lêztir dibe. Navçeya Celeb (1839) û Bûldûk (1854) avakirin. (1583) Gor gundiyên ji Bûldûk-Sêvika ew di sala 1272 (=1851, hinek jî dibêjin 1842 ne) an de îskan, 1282 an de bi cîh dibin; di 1305 an de mizgeft çêdibe, di 1325 an de ji konan derbasî malan dibin û di 1314 an de seferberlix destpê dike. Bawer dikim rehmetî ew çîroka ji devê mezinên xwe bihîst û nivîsî; tişte em ji wir derdixin ev e: Elên hatin navenda Anadolê ji qirnekî zêdetir rewşa xwe ya berê domkirine. Eger ew gotin rast bin, ji Reşiyan êla Sêvikan çûyîn û hatina xwe ji vvelat qut nekiriye.

Birêz Yeşilgoz dibêje: Piştî hatina Reşiyan ya Anadolê, em dibinin ku ew konfederasyon belav dibe û dibe federasyon. Wekî jêder dibêjin di sala 1713 an de tam 12 êl bûn û gora demê gelek kes bûn. (3Wn i6) Me li jor jî dîtina Sakaoglû ragihand ku dibêje di sala 1763 an de sîstema boybeyî jî betal kirine. Wek nakokî xuya bike jî herdû dîtin rast in. Bi dîtina min ji sala 1713 an bi şûnde sîstema konfederal betal kirin û wê demê beşek hatibû Anadolê. Beşa hatibû Anadolê, li destpêkê sîstema xwe ya federal

dom kirin. Yanî bi boybeyî dihatin temsîl kirin. Piştî salên 1763 an, êdî ew sîstema jî betal kirin û derbasî sîstema gundan, bi gotineka din sîstema feodal bûn. Ew jî di rojekê de pêk nehat, dema Komara Tirk bandora xwe zêde bû, sîstema êlan jî lawaz bû. Di wê federasyonê de kîjan êl hebûn û kîjan li Kurdistan û herêmen din mabûn? Min gelek caran ji mezinan pirs kiriye û hemûyan gotiye ku 12 êlên Reşiyan li navenda Anadolê hene. Lê kesekî wana tam dijmêre jî rastê min nehat. Ewên ku bi piranî têne qebûl kirin ev êl in: Berkatî, Bilikî, Cûtikî, Celikî, Xelikî, Molikî, Mîfikî, Naşiri, Omerî, Oxçî, Sêvikî, Şexbilî. Hinek kes, Oxçiyan û Molikan nakin nava federasyonê. Hinek mezinan digotin Molikî Saxincî ne, lê tê çi watê nedizanibûn. Divê ew nava jî Tirkan lê danîbe û tê wata kesên pez didoşî; mümküne ew ji artêşê re pez didotine. Rastiye, ku ew êl yan jî federasyonan berê ketine konfederasyona Reşiyan. Hinek êl jî hene ku di nav gelek federasyon yan jî konfederasyonan de cîh digirin.

Yek ji wana jîNasirî ne. Nasirî di nava Milan de 70 mal in. (19178) C. Turkay dibêje: Nasirî-Nasirlû ji Reşiya ne û ji taîfa Konar-Goçer Ekrad Yorukan e. Li Semsûr, Rakka, Bozok, Erzirûm, Tarsûs, Edene, Mereş, Kütahya, Kirk Kilîse- Vîze, Boyabad-Qastamonû, Qereîsali-Edene, Sînop-Qastamonûyê dijîn. (160_602) Bi dîtina Ziya Gokalp Nasiran wek qebîle li paş tevlî Milan bûne. (22) Raste, ji ber ku êlêka Reşiyan e û dema Reşî belav bûn ji ev beşen veqetiyan beşek jê tevlî Milan bûye. Gorî rojnama Hurriyetê nivîsî jî, li Riha Wêrançehrê û gundên êlên

bi navê: Şihan, Kuran, Milan, Nasiran, Poran, Devan, Çemikan, Tirk, Dodkan,

Qeregeçî, Hidrekan, Metinan, Kejan, Çûvan, Ubeyan, Begara, Behiman,

Şûrûtan, Axa va tan, Naiman, Sevdan, Mendan, Kumlahşan, Berguhana u

Cemaldinî hene. (46) Lê wekî jêderên din iî didin xuyakirin ew li cografyeka pir

fireh belav bune u mümküne gelek jı je heliyabin.

I

Reşı-Xelikı

Ji van elana ya bi navê Oxçî em dizanin ku ji arteşa Osmaniyan tır-ox-ok

çêdikirine û ji bo wê jî ew nava le danîne. Di esle xwe de je re ela Izzeddın yan

jî Biyan tê gotin. Gor Roger Leskot: Biyan (Ocaq Izedîn) şaxek ji Reşiyan in ku

ew êla li başûre Meletiyê rûdinê. Hinek jî dibêjin şaxek ji Milan in. (13219) Di nava

Pezgewran de jı eleka bi nave Bıcan hebu, dibe ku neman el be. Dışa di nava

Berazî (Bûrazı) de jî êlêka bi navê Oqane heye; heta êlêka bi navı Reşiyan jı di

nav de heye. Biyan dora 10 hezar kes hene û U 45 gundan belav bûne. Serokên vê hozê berê ji mala Hec Orner derdiketin. Di sala 1850 an de axayê wan ê dawî Dell Xelîi, ku Amkan pişta xwe dabunê, şerek li dijî Şexan ku Tirkan pişta wan digirt kir. Di şer de Axe direve Gawûr Daxi û paşö dîsan örîş dike. Paşö Tirk wî digirin û dibin Edenê. Etmankan ji Dêrsîmê hatine, hîn beşek jî li wir in. Ew di nava sedsalên XVII û XIX an de hatine Sûriyê. (132'16) Buyereka balkeş jî di şere Ş§x Seid de pêk hatiye. Axe Biyan Kor Reşîd di dema ser de, diviyabû pira riya hesin li ser diçû, wekî ya Heşarge bihatana hilweşandin, ku ji Kemalîstan re alîkarî neçe; le

Kor Reşîd bi tenekeyek zêr milet firot. (,3219) Oxçî-Biyan, Berazî, Reşî heinû girêdayî Şadiyan bûn.

Gundê Nasira-Beşekî încovê

Omerî jî carna di nava Canbegan de carna di nava Milan de xuya dikin. Lê êlêka ku demeke gelek dirêj di nava Reşiyan de ma ye. Wek gelek êlên din ew jî li Xorasanê dijîn, Gora ku Melîkonf dinivîsîne: Ev êla Axa Muhemmed Xanê Qecerî, di sala 1780 an de ji Qerebax û Qeredaxê ji bo ku sînorên xwe ji Afgan û ji Ozbekan biparêze aniye wir. Serokê Omerî Axa Muhemmed Xan bûye. Ew di Gulogan de rûdinên. Paşe jî navê xwe bi Gulbadî guhartine. Du par in: 1. Gogî: Esfendiyarî, Eskerî, Emîr Xanî, Xadimî, Muhaciri, Mucawirî, Melîkanî. 2. Omeranî: Xewanîn, Seydan, Azîmî, Fazil Elî, Mehmûd Canlo, Melik Mehmûdî. Xêr ji wana êlên mina Mirdêsî, Canbeg, Reşî jî di nava Milan de hene. Bi wî rengî êl û zend û konfederasyonê gelek caran ketina nava hev û ji hev veqetiyane. Ewr yeka di rewşa Reşî îro lê belavbûne de jî diyare. Êlên girêdayî wrê konfederasyonê li her derekê tên dîtin û carna navên nû jî mirov dibîne ku ne ecêbe.

Yek ji êlên girêdayî jî Cûtikî ne, ku li Mereş, Semsûr û Meletî dijîn.

Mûlûkanli-Melle Bekir ji Reşiyan e û Tirk wana vvek Konar -Göçer Ekrad Yo- rukanî Taîfesî bi nav dikin. Li Semsûr, Kolik, Inecîk-Gelîbolû, Meletî, Erxenî, Dîvrîxî, Bozok, Sari-çîçekdaxi, Arapgirê dijîn.'160'5981 Molikî li Meletî di gundên mîna: Özel, Fatih, Kûyûlû û Egîn de dijin. Hecîmûstafa Ûşaklari cemaatı giiê- dayî êla Omerî ye, ku li navça Gordos-Sarûhan, Kizilhîsar-Sixla, Sêwas, Heleb û Rakkayê dijîn û ji Tirkmenên Yorukani taîfesî ne.'160'3961 Cemeeta Hecîomerî ji Reşî ye û li Semsûr, Mereş, Kilîs, Dîlok, Meletî, Tirhala, Helebê dijîn.'160'3971 Halikan-Xelikî jî bi eslê

xwe ji Iranê ne û girêdayî Reşiyan e. Ew jî li: Meletî, Mereş, Qonya, Bîrecîk, Rakka, Erzirûm, Qers, Ahiska, Sêwas, Amasya, Qere- hîsari Şarkî, Heskîf, Semsûr, Tokatê dijîn. (,WV40,) Xelikan li van gundên Cîhan- beglî belav dibin: Xelikên Jêr/Dondûrma (Golyazi), Qemera (Yapali), Qolita (Saxlik), Xelikên Jor (Qerecdax). Serhejmara wan bi tevahî digihîje 25-30 he- zaran. Omeranli-Umranli girêdayî Reşiyen Milan e; li Şîro, Semsûr, Rakka, Amed, Bîrecîk, Mereş, Canîk, Kütahya û Mûtê rûdinên.'160-7481

Malbata Dûmanlidax-Qemera

Omeriyên li Anadolê jî ev gund in: Ornera (Tavşançali) 1845, Tavlioren 1870, Çöpler 1900, Acikûyû 1920 û Beşkardeş in. Tê gotin ku berata Osmaniyan ya boybegiyê ji Altilara di destê Hesen Beg de bûye. Ew bi pâşniyara Mistefayê

Berkatî (Alîşîroglıı) ji alî waliyê Sêwasê ve hatiye dayîn. Bilikî jî li nêzîkî bajarokê Şereflî Qoçhîsarê, li günden mîna; Buyuk Kişla, Kanli Kışla, Hesina (B. Damlacık), Heciyan (K. Damlacik), Kaynar (Odunbogazi), Açikkûyûyê dijîn.

Du günden Bilika

Bilikî-Şöxbilı jî li dora bajaroka Çîçekdaxi ne û li gundên mîna: Çewîrme (Çamalî), Torina (Bahçepinar), Hocik/Oçko (Çanakpinar), Çîdeli (Çîxdelî), Uçkî (Uçkûyû), Gedere (Pûhrenk), Qişle (Mehmûdlû), Zekere, Okço, Ramko (Dogankaş) ne. Mifkî jî li dora Çîçekdaxi ne û li van gundana dijîn: Kanîkurik (Korpinar), Qişle (Terziyanli), Çîmelî (tevlîhev e), Kûlik (Kûlhoyuk), Pizbênka Jêr (Şûayîplî), Mala Benê-Pizbênka Jûr (Tosûnbûrnû), Ûsînli (Huseynlî), Gûrîo (Yeşîloba), Golî (Gollû), Sêrek (Seyrekkoy), Tawira (Taburoglû), Sira (Uzûnpinar), Xaladîno (Hatûnoglû),

Otko (Arapii Cedît) û Solax (Horla) in. Navê gundên Mifkan bi navê gundên Xorasanê ve gelek nêzîkî hev in. Ji alî din ve Mala Kosê-Kosê Paşa jî li vê herême gelek gund avakirine. Ew bi navê Qerehalîloxûllari ji dora İslahiye û Meletî hatin bajarê Kirşehîr bicîh bûn. Kalê wan jî dibêjin em ji Xorasanê hatine û ew bîranîn gelek bi nirxe...

Gelek jêder, nûser û keseyetî dibêjin; Reşî konfederasyona Kurdistanê ya herî mezin bû û dema koçber bûn gelek zirar didan gelê nîştecîh û êlên din ên Kurd. Xelkê girêdayî wêkomêhatinAnadolêbi şûnde w'eknîvkoçer dijîn. Di biharê de diçûn zozanên Yama û Çîçekdaxi. Di payizan de jî diçûn Çûkûrova, Dîlok, Suriye û Helebê. Riya xwe ya koçeriyê jî di nav aşîreta Baliyan re derbas dibû û hîna jî jêra dibêjin "Riya Reşiyan". Reşiyan di sala 1780 an de mecbûrê îskanê bûn. Di deftera Meletî ya Tahrîr de navê Gundê Çixlikê derbas dibe û di sala 1560 an de wira cîhê Atmali û Çakalliyan ya zivİstane bûye. (15-23)

C. Orhonlû dibêje: Ji bo dewletê pirsgireka herî mezin Reşî bûn. Berê zivistanê diçûn Arabîstanê (gereg Sûriyê be-Ş), lê niha ew terine Bozok û Ûzû-

nyaylaye. Di sala 1830 an de li eyelata Sêwasê ber bi ber cîh kirin. Lê ji bo ku ew bi serê xwe nekevin tevgerê, dewletê "Nazir" ji bo wan tayîn kir. Ji bo wê li Qonya û Enqere jî ew kara kir. Nazir ji begê êlan bûn. Bi vî awî rutbek danê û beşdarî berpirsiyartiyê kirin. Elên mina Reşî û Avşar ên hejmar zêde, gîştik li derekê ne, bela bela bi cîh kirin. Avşar li Uzûnyaylê bi cîh kirin. Di sala 1831 an de hîna jî bi cîhkirina Reşiyan berdewam bû. (901l5) Belkî ew sîstema nebûya, dewletê nedikarîbû êlan bicîh bike. Yekê jî wê sîstemê di nava gel de çîneke xwedî îmtiyaz û pişta xwe dayî dewletê derxist, ku wana mala gel şewitandin. Zilma dewletê berê li gel dikirî niha bi destê axayan dibû û ew çi bixwestana dikirin. Yên ku jê heznedikirin dişandin eskerivê û careka din venedigerî, baca gel giran

kirin, xelk wek xulaman bi kar dianın û dest davêtin ar a gel. Eger wî sîstemî jî têr nedikira dewletê wê carê serokên êlan dîl digirtin.

Di encama wê de Refiyên di sala 1848 an de zivistan li navça Cîhanbeylî, havîn jî li Çîçekdaxi derbas dikirin bi vî awî hatin bi cîh kirin. Ji bo ku ew bi cîhekî din ve nerin û bihara wê sale bi darêzorê wana bi cîh bikin, ji wan rehîn hatin girtin. (17l2W) Qeymeqamê Bozok, di sala 1842 an de ji bo nîştecîhbûna êla Haremeyn (-Cûtika) hema dixwest ku ew kes ji eskeriyê re bêne şandin. Heman tişt ji bo êlên mîna Taban, Heciyan û Têrkan, yên li Enqere hatin bi cîh kirin jî xwestin.'171242) îro jî ew navê Haremî bi kar tê. Bi vî awî me hewl da ku li ser wê federasyon/konfederasyonê agahiyên girîng bidin. Li ser hejmara wan jî gelek kesan hewl daye ku agahiyan bidin, lê ew bi giştî nayêne hejmartin. Ew ne mumkune jî. Lewra ji bo wê kadro û îmkanên mezin pêwîst in.

Di sala 1290 (186971874?) an de li navenda Anadolê xela dibe. Gelek êl belav dibin. Lê ew belavbûna kom bi kom û malbatên nêzîk bi hevre belav dibin, li her çar aliyan pêk tê. Bi taybet Re§iyên ku diçûn Kurdistanê li herêma Berêz dijiyan; ku Beraz navê herêmeka li Rihayê ye û ji navê koma Berazî tê. Hinek beş diçûne Çûkûrovê, dora Ceyhûn. Beşekî heta Aydin-Sokê û hinek jî diçûne Samsûn-Bafrayê. Ewên ku rewşa xwe baş jî li cîhê xwe diman. Ewên ku çûn bi piranî vegeriyan cîhên xwe yên berê, lê hinek jê nehatine. Gelek serpêhatiyên bi wê goçê re tekildar in hene, ku hêjayê nivîsînê ne. Emê wê, ji lêkolînêka din re bihêlin, niha jî em li ser serhejmara Reşiyan çend dîtinên nivîskaran ragihînin.

M. E. Zekî dinivîse ku ji Reşiyan 7000 malên xwe li başûre Erzurimê dijîn.<19) Dr Frîtz jî dinivîse ku li Erzirûmê êlên mezin hene û yek ji wan jî Bilikî ne. (H'26) Di heman pirtûkê de tê nivîsîn ku Mehmûdî û Memî Rîşa^ li kela Hc^apê dijîn. (843) Li Helebê 27 êl hene, wana: 1-Reşî, 2. Rişvan, 3. Oxçû,

4. Şêxika, 5. Torina....Ji wana tê zanîn ku Reşî Tirkmen in. Borkar di seyahat- nama xwe de wrek Tirkmen dide nasîn.*8"52* Li Helebê zivistan, li Sêwasê jî bi-har derbas dikirin. Di 1766 an de Nîebuhr dinivîse ku ew 12.000 kon in.<l56"n2) Niqta balkê§ ewe, ku li cîhê gelek jihev dûr Reşiyên bi hejmarên mezin dijîn. Nîebuhr ji bo yên koçber vê yekê dibêje lê bi dîtina min mirov nikare serhej¬mara Reşiyan hesab bike. Lewra Reşî beşekî gelek mezin ê Kurdên koçber

dike nava xwe.

Mirov dikare ji rapora dewletê dawî istifade bike. Levvra devvleta Tirk a kûr hesabê serhildana Kurdan ya dawî dikir û ji bo amadekariya xwe dixwest hejmar û taybetmendiyên êlan bizane ku hesabê xwe bide meşandin...Gor rapora dewleta Tirka a kûr-MIT-arteşe, ya bi mora "pir pir bi dizi" hazirbûyî, Reşiyen li Kurdistanê taybetmendiya xwe ev in: hejmara xwe 38.254 kes in, Kurmancû henefîne. Li Kolik, bûcaxa Yarpûzlûû günden wê bi tevahî. Günden girêdayî bûcaxa merkeze jî ev in: Şexbaba, Bağlar, Arili, Çiralik, Salkimbax, Yelkûvan, Erîkdere, Zeytin, Çobanli, Ortanca, Çataltepe, Damlacık, Çatbahçe, Koçtepe, Sarikaya, Doluca, Texmenli. Akicilar: Olûklû, Yixinak. Narince: günde Tutenocax e. Beşek ji êle li navenda Kolik û günden wê; navenda Çelîkhan û günden wê belav bûne. Ewên li Kolikê û günden wê nîştecîh, têkiliya xwe bi yen derve û bajarên din re tunin. Girêdayî welatê me ne û tevlî serhildanan nebûne. Agahî: berên (qebîle) mina: Avûcan, Bekiran, Bişaran, Deli Yûsûfan, Garinan, Gaziyan, Geller, Hecîelî, Hecî Huseyn, H, Osman, Haçmaha, Hamkadom, H. Dedeler, Hesenogullari, Husabahan, Husunan, Kalenderan, Kalvan, Koseûşaklari, Maden, Mahûhan, Memzaran, Mesti kan, Mûllan, Murtan, Mutan, Sixikan, Şîgan, Şîman, Şîşan, Sûrbahan, Teşikan in. (108'24) Dîsa ela Bilikan wek 1717 kes li Xinisê tê xuyakirin. (108 123) Sefkanî li Tekmanê 159 kes xuya dikin.008"134’ Li Nizip û

Yawûzeliyê bi gîştî 21.275 Reşî hene; Kurmancî, tirkî deng dikin û henefî ne. Girêdayî Reşiyen wir:

- Tûrnalar (Qulingan): Ezîdî
- Arapli: Henefî û Elewî û li Oxûzelî ne.
- Qereşikli: Bi tirkî deng dikin, henefî ne û beşekî jî li Sûriyê ye.
- Çepnî: Tirkî dengdikin û Elewî ne, li Nizîp û Sûriyê hene. Li Izmir, Aydin, Erzirûm û Qersê şaxe xwe hene.
- Bereketli: Li Kercewzê wek 8000 kes nîşan didin, şafû û Kurmanc in.*108-220)
- Reşkotan: Li B işeri yê 7500 kes dijîn, Kurmanc û şafû ne.n08‘274)
- Reşiyan: Hîlwanê dijîn, 659 kes in, henefî ne, ji Îraqê hatine. (108"334)
- Nasran: Li gundê Bakimli yê girêdayî VVûranşehre dijîn 786 kes in. (lü8"333>
- Mûsik Êlên mîna Seyhan, Reşkan, Havarî hene ku evv Êzîdî ne.tl08‘362)

Gor texmîna min Reşiyen li Semsûrê mirov dikare bêje ku ji gundê Narînçê yê girêdayî Kolikê bigire, bi tevahî bakûrê çemê Kahta û bi tevahî Nav- ça Sincixê digre nava xwe û li rojava beta navça Tûtê tere û bi tevahî Kolikê jî dike nava xwe û herêmeke çiyayî ye. Li Meletî jî Atmiyan-Çeqalan, Xelkaşeşin, Delika-Celika, Bistika û Sêvikî hene. Navê Bistika, Pisiyênli Kirşehîrû tînin bîra mirov lê pêwîste hîn kûr bê lêkolîn kirin. Şûniyen Kolikê 100 hezar in ji wan sedî 80 Reşî ne. Sincix 10 hezar in bi tevahî Reşî ne. Wekî din li Çelikhanê (25 hezar) ji % 60 in, li Pinarbaşi û Kûrû Dere jî nêzîkî 20 hezaran însan hene û bi tevahî Reşî ne. Texmîni li wê herêmê 250 hezar serhejmara Reşiyan heye. Wekî min gotî, dewletê

ji bo Reşiyan çavên xwe digirtin û zêde nedûçû ser wan. Ji bo wan di bac sitendine de jî em dibînin ku sîstemeke cüda bi kar dianiye.

<LU

<UJ

<U

Z

xşa êlên li Kolikê <76)

Wek mînak, gor kanuna kevn: Tirkmenên ku pezên xwe heyî -ji bill Reşiyan- û ji Ekradan, ber biharê ji her keriyekî (300 pez) miyek û ji her malekê pereyek, yarek penêr û hiriyek dihate stendin. Paşe, şuna penêr û tişten din sê- perê dištendin. Tirkmenên ku miyên xwe tuneyîjî pereyek dihate stendin.... Dema ji zozanan vedigerîn jî wek wê bac dištendin. Ji Reşiyan, ji bere ve bac nedihate stendin, lê ji bo zozanan pere dihatin wergirtin. (974U)Reşî bûyîn xwedî îltîmaseke bû, ku dewletê nêdiwêrî jê pere û esker bistîne; eğer bixvvesta ew dibû sedema serhildan û aloziyên mezin.

Taybetmendiya Reşiyan yek jîew e, ku li hember zilimkaran mazlûman di-parastine. Di komkujiya Ermeniyan ya di sala 1894 an de serokê Reşiyan Yakûb Ragip Paşaye Besnî, Ermeniyên Meletî, Besni û Semsûrê parastin û nehîşt bila ew zirar wan bibinin. Tewerê ji êla Huweydî yen ku ârîşû Ermenan kiribûn 16 kes kuştin; serokê êla Kurd Dirêjan Şatiroglû Mistefa jî hewl da. (10ü436) Me ji mezinên xwe bihîst ku heta Komara Tirk bê İlan kirin di nava Reşiyan de gelek Ermen hebûne. Bi taybetî jî ewên ji ber zilma li Zeytin-Mereşe reviyabûn hatin nava Kürden Anadolê. Tenê li

gundê min 15 malbatên Ermen hebûne. Eleman tevger li nava Kurdên Sarizê jî pêk hatiye. Gor gotina herême: Mehmet Qahya ji 12 gundên Sine Milî berpirsiyare. Rojekê xeber didinê ku eskerên Tirkan Ermeniyan dawêjine Bîra Comcomê ku ew bê binî ye li çiyayê Qilcanê. Heta digihîje wir 300-400 Ermenî avêtibûn, lê ew 585 kesî ji destê Tirkan digire û heta Helebê dibe, li wir teslîmê Fransizan dike. Jêderên Ermenî, dewlet van jî mîrîtiyên nêzîkî xwe vviha rêz dikin: Memikan, Boxoran, Reşîdiyan (Reşiyan- Reşkotan) û Mendikan. (1947) Bê gu man bingeheke xwe ya dîrokî û olî ya wê nêzîkatiyê heye.

Li ser ola Reşiyan lêkolîneka serbixwe pêwîste, hêvîdarim kesek wî xizmetî bike; lê bi kurtî; mirov dibîne ku li ser ola Reşî û federasyonên din ên mîna Atma, Sine Milî, Milan, Canbeg û yen din giranî û şopa Zerdeştiye hîna jî heye. Mezinên me digotin ji Sêvika bûkêkê agirê xwe yê bûkaniyê heta dawiya jiyana xwe şen parastî ye. Di dema koçeriyê de jî wê li ser heştir di tenekekî de diparastiye. Di çîrokên Reşiyan de agir qet venamire û pîroz e! Cîhê baweriyê jî Ocax in. Heta vê dema em têde ne jî, mezinên Reşî, Zerikî, Sine Milî û êlên din sibê li ber rojê dia dikin. Hîna jî gelê me dibêje: "Bi vê rojê be!" "Bi rojê sor hîva zer be!" "Bi ocaxa te be!" "Heqê êr/agir!" "Bi serê te be!" "Bi agir ve mîz mekin gune ye" "Tûkê êr mekin gune ye" û gelek sond û nifirên bi wî rengî hene. Li gundê Kizilkale-Sêwas du ocax hene. Talîbên-mûmînên ocaxê Baba- mansûr êlên Sêvika û Balabanê li Zara û Koyulhîsarê dijîn. (164463)

Hinek dîtin hene ku dibêjin: beşbûna êlan ya wek 12 an ji Sumeriyan û Dûmûzî yê Xwedayê heyiyê tê. Yanî di wî olî de seks pîroz e û ew jî ji 12 salî ve dest pêdike. Sêvika êla min e û girêdayî Reşiyan e. Lêkolînên me di nav Reşiyan û Kurmanc û Zazayên li Kurdistanê kirî de, çanda agir û ocaxan cîhekî xwe yê gelek girîng heye. Agir bi ave nayê vemirandin,

tiştên pîs nayên avêtin, dora ocêx hertim paqij tê girtin, ji bo agir hertim vêkeve û ocax dû bike

hertişt tê kirin û ji bo berdewamiya malbatê jî cîhekî xwe yê girîng heye; ewên ku zarokên xwe tunin re dibêjin "Ocax kor" ku ew jî nîşana pîrozbûna agir e. Ew di alî folklorik de jî bi lîstika Sinsinî hafiye temsîl kirin û di nav Avşar û Reşiyen li Kurdistanê de bi nav û deng e. (I28 169) Niqta din a balköş jî di nav êlêkê de yan jî di nava federasyonekê de olên cüda tên ditin. Wek mînak: Reşiyen li Xorasanê Şîa ne; yen Rûsya û Ermenîstanê hinekê Ezîdî hinekê sunnî ne; yen Kurdistanê him elewî him sunnî ne û yen li Anadola Navîn jî sunnî û elewî ne. Ew belav bûn hêjayî lêkolînê ye. Lêkolîneka bi wî rengî dê naveroka vê pirtûkê ve hevdû temam bike.

Reşı-Sersor-Kolık

Gor rapora dewlata Tirk a kûr ku amede kirî (1970) û bi mohra "pir pir weşartî" hatî bi dest xistin de, Omeran/Omerî li Hezro dijîn, 6400 kes in û safiï ne. (IDS'98) Li Ixdirê jî Bilikî hene lê hejmar mne. (108‘I69) Li Meletî Argûvanê 2000 kesen Atmekî dijîn ku ew Caferî-Elevvî ne.ll08'203) Atmaliyên li Pazarcikê jî 19. 029 kes in û şafû ne. Yen li Afşîne jî Elewî-Sersor jn. (10S'2(1(l) Disa gor wê êla Sevkarî û Sûveydî girêdayî êla Siyakarî xuya dikin. Sevkarî ji 1500 kesî pêk te, şafû ne û Kurmancî deng dikin. Li günden mîna Çatmaolûk, Adakli, Yeldexîrmenî û Arica ya girêdayî Kîxiyê dijîn. Bi serhildana Şex Saît re alîkarî kirin, dîndar in, aram in û girêdayî welatê me ne. (108'79) Selîfkan 900 malbat in, koçber in û havînan tên deşta Mûşû. (19"176) Bi vî awayî em dibînin ku di nava federasyona Reşiyan de gelek ol û mezhebên cûda hene. Ew jî îşareta wê yekê ye, ku ew olên pişti Zerdeştiye bi darê zorê bi Reşiyan da ne pejirandin.

Kincên êlên li dervayê Welat ji herêmen din ên Kurdistanê cûdatir in. Di piraniya êl û zendan de kinc hema hema wek hev in. Jin, xeftan-zebûnê sê etek-ber li xwe dikin; berên pan li paş û her dû berên din li peş bi ser jûniyan de dirêj dibûn. Di bin de jî hêvalkiras-derpêkî dirêj li xwe dikirin. Bi ser wan de jî peştmal-bervang berdidan û heta lingan dirêj dibû. Di lingan de jî keloş hebûn. Di jor re jî kirasekî bê su kir û bi ser wî de jî kolcix-salte li xwe dikirin. Bi ser wran de bi ser zendê xwe de kolçix li xwe dikirin. Nav jî bi pişta terêbûsê dipêçan. Di demên bere de, yanî berî 50 salan, jinan kofî d idan serê xwe. Taseka bilind didan serê xwe û bi şara girêdidan. Serî şare jî gor qudreta malê pîlîkên zêrînî, zîvînî û yen hesin pê ve dikirin. Lê niha ew neman; tenê serlihêf û şar e. Mêran jî, derpê û bi ser wî de fîstanê sê etek; di jor re jî kiras û çakêt bû. Ew jî kaloş dikirin lingên xwe. Serî keç didane. Kincên êlên Anatoliya Navîn bi yen Xorasanê ve gelek nêzîkî hev in. Mirov dikare yen rojavayê Kurdistanê jî li wan zêde bike.

Li kêleka mîrê êlê, ji her qebîleyekê kesek hebû û koma rûspiyan pêk dianîn. (15S'3) Ewr jî sîstema êlan ya rêxistinî dide nişandan. Heman sîstem ji bo federasyonê jî hebû ku her serok-êl di civata serokê zendê (mîrêmîran) de kom dibû û biryar tevhev wrerdigirtin.

Halaçoglû dibêje: Zend (boy) ji alî Boybeyî (mîrêmîran) ve, êl jî ji alî Mîr ve dihate birêvebirin. Beg ji nava Zendê û ji nav kesên bi cesaret, maldar û rast dihatin hilbijartin. Mîrîtî ji alî dewletê ve dihate pejirandin bi şûnde dikete kiryarê. Lê di nav Reşiyan de ewr cûda bû; mafê hilbijartina Beg tenê di destê rûspiyan û kesên din ên peywêndîdar de bû. (,56',7) Sîstema Reşiyan gor wê deine gelek pâşketî û demokratik e ku beg ji alî mîr û rûspiyên zendê ve dihatiye hilbijartin.

Gelek kevneşopiyen Reşiyan hene ku bi yen êlên din ve wek hev in. Wek mînak: di dema koçberiyê de wexta yekî kesekî xwe dimiriye; Elan

derdawê konên xwe berdidane, telikê ser kumên xwe je dikirine, benê bi ser saqoyên xwe de berdidane, balîfên jûrê-odê ku enîşka xwe didan serê dizivirandine, kincên xwe vajî dikirin, neynikan paç dawêtin ser, tazî nediketin nav nivînan

û mehekê li cîhê şîne rûdiniştine...

Dema jinek mère xwe dixapîne yan jî jinek bimêrekî ve li bahev didîtine, pore jinikê jî kur dikirine û ew tazı dikirine û ji mala bavê re dişandine. Ecêb e ku ew nedikuştine û ji bo ku di nava gel de rezîl bibe jî ew yeka dikirine.

Di dawetê de jî jin û mer diketin destên hev û dîlanê dikişandin û ew dibûye sedem ku xort û keçan hevûdû dîtiyê, qewl ji hev distendine. Yekê jî berê di malan de bi desdarê savar dihêran û di malekê de keç û xort digihîştin hevûdû. Li nava odê destar bi cîh dikirine û li dora destar yek keç yek law rûdiniştiye û bi darê destar digirtine. Ew hevdîtin tiştekî eşkere bûye. Gor wan kevneşopiyana civakeka gelek serbest û demokrat bûye; ti têkiliya vê civatê bi êdetên Islam û misilmantiyê re jî tunebûye.

Günde Sevika kincen Reşıyan yen nu

ŞEXBIZIN

(LER-LEK-LOR)

Li Anatoliya Navîn êl yan jî federasyoneka Kurdên bi nave Şexbizinan heye, ji zaravê xvve re jî ew dibêjin Şexbizinkî. Gor lêkolînên min kiri ti hinek cîranên Şexbizinan yen Kurmancî axêf ji van Kurdan re dibêjin Ler-Leran. Hinek wek Şazî jî bi nav dikin, dibe ku cîhên jê hatibin; ew jî dibe ku Şehrîzor, Şîraz yan jî Şîrvan be.. .Hema hema piranİya Şexbizinan navê Ler li xwe nakin û nizanin jî; mümküne berî 50 û 100 salî ew bizanibiyana lê îro tenê dibêjin em Şexbizin in. Wata wî navî jî Kurdên herêma Haymanê kes tam nizane; herkes gora xvve şirove dike. Ji gundê Kosê

Abdal-Haymanê Hafizê Sadûlah (di 1997 an de 67 salî) dibêje: Şexekî me hebûye û bi tirkî gotine "Şexe me-Şex bizim" û bûye Şex-bizin. Hinek jî dibêjin: Ew bizin xwedî dikirine û ji bo serokê wan jî şexek bûye gotine: Şexe-bizinan û hvvd.. .Eğer mirov li secera (dara jiyana êlê) Sêxbizinan mêzebike, tê dîtin ku gelek navên kesan wek Ṣêx têne xwendin. Ew jûşareta wê yekê ku navê Şûx di nav wê êlê de kevneşopiyek e. Eger ew xwe bi bizinan jî xwedî dikiriye-ku ew jî sedî sed e, lewra ji çiyayê hatine tenê dikarin bizin bijîn- xêre ew nava koka xwe ji wir di gire. Niha pirs ev e: Gelo Şexbizin Lek in an na û herêma wan ê dayik ku jê hatine kuder e?

Hafizê Sadûlla

R. Blaga ji pirtûka "Qewmê Lor" wiha radigihîne: Cîhê ku Lek lê dijîn re Lekestan tê gotin; di navbera bakûrê rojavayê Loristan (li sê navçên mîna Horru, Selsele, Delfanê dijîn), Kurdistan, Ezerbeycan û Farsîstanê ve cîran e. ilam, Lûmar (Şîrvan Çardavol), Mehran, Nehevand, Melayar (%50), Hurre- mabad (%40) û Burucerd jî dikeve nava Lekestan. (95'160) Ji wir em fêr dibin ku heiêmeka bi navê Lekestanê heye û bê guman ji gelê li wir dijî re jî digotin Lek. Gelek jêderên din jî wê dipêjirînin û zaravê Lekî bi Lorî û Goranî ve girêdidin.

E. Yawûz dibêje ew li başûre çemê Guyê rûdinên. (104'50) Dr. Roûsseaû dibêje: Bextiyar, Feylî, Lek-Lok bi Lorî diaxifin. (lü4W) Xuyaye ku ew koma Kurdên başûr pêk tînin. Li Loristanê (Lakîstan), zaravayên kurdî yen başûr bi na\ê Lakkî tê zanîn.042'47) Herêm, ji alî gelê wir ve wek Lakîstan tê binavkirin. Hema hema tevahiya nifûs bi Lekiya ku zaravê Goranî diaxivin. Goranî û lehça xwe ya jêrîn Lakî, Pehlî/Feylî û Hewramanî li herêma bloka ziman pêk tînin.054' 32) Di alî ziman de nêzîkî Kelhorî û Kirmanşahiye. Lekî nêzîkî Goranî ye û ji gîştiya wan re Lorî tê gotin, lê Lekî nêzîkî Kurmancî ye. Zimanê helbestê ye; nivîsên olî ye. Ehlî-Heq û Şûtî bi wê

zaravî ne. (95'160) Ji zanyariya wan nûserena bi şûnde mirov dikare bêje ku: Lek-Şexbizin şaxekî Goranan e.

Di pirtûka herêmî ya bi navê "Yenîce û Şâxbizin" de tê nivîsîn; ku welatê Şêxbizinan yê yekemîn navça Bazanê girêdayî Silêmaniyê ye. Ji bo Bazan di "Kamûs'ul Alam" de wiha tê nivîsîn: 30 km li rojavayê bakûrê Silêmaniyê, li kêleka milekî Dîcle ye, sê hezar nifûsa xwe heye, bi nehiya Sêvkê ve tevhev 159 gundên xwe hene û heft êlên Kurd lê dijîn. 10 hezar serhejmara xwe heye û hemû misilman û Kurd in. Şêxbizin ji ber sedemên nayê zanîn çûne Yêmenê û demekê li wir mane. Di dema Emewiyan de, Kurdên li Yêmenê hatin koçber kirin û ew çûn Xorasanê, di nava wan de yên Ehl-î Beyt jî hebûn. (92;,) Ji wir jî em fêr dibin ku herêmêk yan jî navçeyek bi navê Bazan jî heye ku îhtîmala yekemîn ewe, ku navê xwe ji wir wergirtin. Ew herêm li ser silsila çiyayê Zagros e û bi dirêjahiya dîrokê re bûye welatê Kurdan.

Li ser wan çiyana wekî berê jî me got gelek êlên din ên Kurd jî jiyane. Dibe ku di dema koçberiya wan de, yan jî piştî tekoşîna li dijî Ereban tevhev hatibin bakûr û Anadolê. Nivîskarên Ereb dîroka di sedsala X û XI an de qala Kurdên li Şehrîzor, Kirmanşah, Hamadan, Nehavendê dikin û wê demê Şehrizor navenda eskerî û politîk e. Yane herêma di navbera Hewlêr û Hamadanê di destê Kurdan de ye. Li gorî Ebû Dulaf, xaka Şehrîzor ji aliyê qebilên wek al- Calaliya, al-Yabsan (Basiyan), al-Hikmiya û al-Suvliya ve dihate çandin. (3) Ji wan Celaliyan em nasdikin û me qala wan kiribû. Bi dîtina min Suvliya jî Kurdên îro em wek Sewêdî bi nav dikin e. Yên din ez nizanim kîjan in, lê dibe ku Şêxbizin jî di navê de hebin. Dîsa li gora heman nivîskarî, Kurdên vê herêmê ji xelîfe re seri nedanîne. Gorê belgeyên dîrokî heta sedsala X an hebûna Kurdan ya li Xuzîstanê tê qebûl kirin, ji vê demê bişunde êdî Ereb dagir dikin. Ibn Haukal û al-Idrisî, dibêjin Loristan cîhekî dewlemend ku Kurd lê dijîne. Cografyazanê meşhûr Yakut

jî dibêje li çiyayên Isfahan û Huzistanê qebîleka Kurdên bi navê al-Loriya dijî. (3) Bi vî awî em dizanin ku Loristan-Lekestan welatê Şêxbizinan yê kevn e. Ew kevnbûn jî diçe bi hezaran salan dibîne.

Wekî Şerefname û Şahname jî didin xuyakirin, berî hezaran salan Kurdên wir kalên Loran, Lar bûne. Gurgîn Mîlad ku di meydana ceng û şeran de tekemêr, çavnetirs û di merdîtiya xwe de bêmîsal bûye Kurd e û nêzîkî 4000 salan e neviyên wî di wîlayeta Lar û Fars de fermanrewayên serbixwe ne (157-65) pz w£ Baweriye de me ku ew der welatê Kurdên Lor e. Lê hinek

dîroknusên Tirk dinivîsînin; ku li Tur kıs ta ne bajarê Lolan ji Loran ma ye. (9,‘21) Ew bajar ji sedî sed ji Lor-Lekên di dema Saka de li wir jiyane de ma ye. Di beşûn derbasbûyî de jî me gotibû, ku çûyîna Macaran re û bi tevgera Atilla re (Bi dîtina min Atıla bi xwe jî Kurd e-Reşî) jî gelek Kurd berbi rojava çûn. Li ser wê bingehê: Leken (-Erdalan) ku çûbûn Romanya navê Erdel cîhîştin; xelîca li bakûrê rojhilatê Derya Kesk Erdelî jî navê xwe ji wan wergirt. (104~54) Ewliya Çelebi dibêje: Ew ji ber erişen Asûr hatin Anadolê û Qefqasya; beşek ji wan derbasî bakûrê Qefqasan bû, bi artûşa Attîla re heta Macarîstanê çûn. Lewra li Macaristan êlên Kurd û Tirkên ku nav danî cîhan de Keleha Lek jî heye.004"61* Ew nav lênana jûspateke ku Kurdên çûbûn Macarîstanê û ewên ku dîrokzanên Macar qal dikin beşek jî Ler in. Fîrdewsî, di pirtûka xwe de qala serpêhatiya çûyîna xwe ya Bexda (1031) dike. Ew li ser Xelîfe helbestan dinivîse, xelîfe ji şûren wî hezdike, lê ji bo ku vvî ji bo padîşahen Iranê yen bi agir bawer dikirî re jî helbest nivîsîne, ji vê yekê hez nekir.]i ber wê û ji ber tehdîtên padîşahe Zabilistanê Mehmûd ji Bexda derket çû Ehvazê. Li wir ji derbasî Kuhîstanê bû. Hakime Kuhîstanê Naşir Lek bû û ew bi awakî merasimi pöşwazî kir. Naşir dostê Mehmûd bû. Mehmûd paşû Firdewsî efû kir. (8616) Ew jî dide xuyakirin ku Lek wê demê li herêmê desthilatdar in û navê serokê xwe jî

Naşir Lek e. Ihtîmala duyemîn ewe ku Lekan navê xwe ji wî kralî girtibin. Ya seyêmîn jî ji Şêxen xwe pir girtin.

Dîroka Lek-3êxbizinan ya kevn mirov dikare di nava Saka de jî bibine û ji 24 êlên Oxûzan Beçenek jî kalê Sêxbizinan e! Ihtîmaleka pir mezine ku Şâxbizin di dema Ebbasiyan de jî hatibin Anadolê. Lê pêdiviya vê bi lêkolînên kûr hene. Di qeydên kevn de û di Şerefnamû de tê gotin, ku di sala 1156 an de serdarekî Lora yê serbixwe tunebû, ew girêdayî xelîfe bûn. Di dawiyê de, Husameddîn Şûhlû ku ji Tirkên Avşar û girêdayî Selçûqiyan bû, kirin fermanrewayê Loristanê. (15784) Wekî di beçên berê de jî me got, Avşar Kurmanc in û girêdana wan bi Selçûqiyan a di wata Tirkan de jî me qal kiribû ku nîne. Tirkan ji Kurdên koçber re gotine Selçûqî. Bi dîtina min wê demê Kurmanc bi Lekan ve tevhev fermanrewayê ava dikine. Piştî Şûhlû, Şuca'eddîn Xurşîd bû hakime Lora Biçûk. Xurşîd, herdû kurên xwe şandin ser êla Cengrûyî-wîlayeta Simhayê. Dema herduyan Kela Reş kirin bin dorpêçê, Heyderê Xurşîd hate kuştin. Xurşîde bav, sond xwar ku kesek ji vê êlê sax nemine; bi ser wê de hemûyan male xwe barkirin. (I57'85) Ew ji bo koçberiya Şexbizinan alternatîfa yekemin e; eğer ew bin, wê demê Cengrûyî jî navê federasyona Şûxbizinan a li destpêkê ye. Lê dîtineka balkûş ji alî Seferoglû ve tê: Lor, di navbera çiyayên Xuzîstan û Isfahanê de dijîn. Qebîleka tevlîhev e, hîna jî di nava wan de Avşar, Bexdilî, Çaxatay û Qerebaxli dijîn,(9I'20) Ew dîtineka gelek girînge; lewra, ew êl yan jî federasyonên têne hejmartin bi piranî Kurmanc in û piraniyan wan kalên Kurdên li Anadol û dervayê welat in. Ew dîtina min ê li jor jî piştrast dike. Ew yeka derdikeve holê, ku wê demê beşek Kurmanc û Şexbizin niha li navenda Anadolê li Loristan tevhev bûne. Ku em dizanin ew ji navenda

Xorasanê hatibûn wir. Ew bûyera me li jor neqil kirî jî, ya di alî demê de bi kêmasiye yan jî ew beşekî din ê Lekan e. Heman niviskar dibêje; zimanê

xwe jî Kurdî (mebesta vvî Kurmancî ye) cûdatir e, lê ew bûne Kurd. Bi peşengiya Kürden Fazlûyî ji Sûriyê koçkirine, li rojhilat û başûre Gurcîstanê di sala 1155 an de Lora Mezin hate damezirandin. Bi hatina êlên Kurd û Erebên mîna Bextiyarî, Haşîmî bi hêz bûn û heta sala 1423 an mîrîtiya xwe dom kirin. (91'20) Ez tevlî dîtina coğrafya tê tarif kirin nabim; bi dîtina min wê demê Şexbizin ketin nava dewleta Şadiyan. Dema damêzirandinê rastê serdema Şadiyan ya dawî tê. Fermandarekî Şadiyan yê bi navê Fazlûn (1126) heye ku Anî rizgar kiribû. Berê jî me gotibû ku di nava dewleta Şadî de Lek hene. Ji wir ew encam derdikeve: Lekên^êxbizinên di nava dewleta Şadî de, bi belavbûna dewletê re hatin Anadolê. Ew ji bo koçberiya Şâxbizinan îhtîmala heri bi hêz e. Dibe ku ew Şâxbizin li Erzirûm, Gîlanê binemalê wan bin. Yekê jî em dizanin ku hinek ji Şêxbizinên li Haymanayê ji Erzirûmê hatine. Dîsa têkiliya wan bi Şebankare vê jî heye ku me qal kir ew di wata Şivane-kar/bizinan de ye, eger mirov wê tercumê tirkî bike dikare bibe Şexâ/Şivan-bizinan... Ibn Batûta radigihîne ku; Mîrên Lor ji Loristanê êla Şûlan qewitandin û ew çûn Farsê. El-Omerî jî radigihîne, ku Şûlan bi Şebankaran ve têkiliya xwe pir nêzîk hebûye. Di sala 1260 an de eskerên Kurd, Şûl û Tirkmen bajarê Mûsil li hember Hulagû parastin. Dîsa qebîleka din a Lor li bakûr û rojavayê Loristanê bi alîkariya Tirkmenên Şûmlû di sala 1155-1186 û 1184-1597 an de Lora Biçûk ava kir. Bi êlên mîna Bayat, Yîva, û Avşar re tekoşîn kir û heta serdema Sefawiyan jiya. (91‘ 20) Şamlû-Şamî jî Kurd in; lê em baş nizanin ku ew Ler in an ne û nêzîkbûna wan bi Reşiyan re heye. Herdû bûyer dişibin hevdû, dibe ku di bingeh de bûyerek be û bi vî awî beşekî Lekan ji Loristanê derketin. Şerefxan dibêje: Kralê Bayata ku yekî Tirk bû, êrişê (texmînî salai 220-Şoreş) ser Loristanê kir lê şikeşt û vekişiya. Hemû wilayeta Bayat kirin ser Loristanê. (157*86) Bayat jî Kurd in, îhtîmaleke ku ew Têrikî bin û ji wê herêmê hatin rojavayê Kurdistanê.

Tîmûr di sala 1389 an de kela Damyanê li Berûcerd heyna û emîrê wê Elîk Izzûddinî şand Semerqentê. (39>

Kurê Tîmûr Şahrûx bi leşkerekî pir di sala 1427 an de hate ser Loristanê û dawî li hikumeta wan anî. Li Loristana Biçûk jî di sala 1502 an de Şah Ristemê Xurşîdî bû serokê hikumetê. Osmaniyan bi Sefawiyan xwestin ku ew hevalbendiya wan bike. Wî jî hevaltiya Sefawiyan hilbijart. Wek tê zanîn ew şafû bûn. Di sala 1576 an de Şah Ristemê 111 an bû serokê Loran û bi Siltanê Osmaniyan Mûradê III an re hevkariyê kiriye û bihev re li dijî Sefawiyan şer kirin. Lorên biçûk 487 salan hukumdarî kirin, lê di dawiyê de nikarîn xwe li dij dijmin bipaiêzin û hilweşiyan. Di sala 1682 an de dawî li hukumdariya wan hat. (32> Dibe ku di dema Şahrûx de jî hinek Kürden Şêxbizinî koç kiribin; ew alternatîfa duduyan e. Lê beri wê dîrokê em wan li Navenda Anadolê dibinin.

Piştî êrîşên Moxolan em Şêxbizinan li Anadolê û di qeydên Osmaniyan

de dibinin. Di deftera Osmaniyan tahrîr-nifûsa ji sala 1539 an de mayı dinivîse, ku Şexbizin ji Qastamonûyê heta Erzirûm-Otlûyê bela wela wek koçeran dijîn. Ji ber ku adetên kevn ên Ezîdiyan di nav wan de hene, Sunniyên derdora wan heqaret ii wan dikirin. Lê di eslê xwe de nave wan ji ''Şah Basnî" (174-82) QJtinên din jî hene ku dibêjin Şexbizinî li Mûş, Malazgirt, Varto, Elezîz, Palû, Ezingan, Gümüşhane, Baybûrt û Amedê nîştecîh in, ji ber şere Çaldiran û erişen Selim di bandora wan bûyerêna de ma û di bin serokatiya Şex Huseyn de li herêma Haymanayê bi cîh bû. Alakom dibêje; di aloziya navbera Iran û Osmaniyan de gelek Kurd hatin şandinî Anatoliya Navîn; tê gotin ku Şexbizinî di serokatiya Şex Huseyn de hatine li Haymanê bi cîh bûne. (126'40> Di we demê de niqta derepdş dikevî ev e, ku Şexbizinî bi Osmaniyan re tevdigerin û ew ji erîşa Selîm jî zirar nedîtin.

Di pirtûka Cewdet Paşa ya bi navê "Ma'rûzat" de: Li sencaxa Kozanê civatên Tirkên ji Selçûqiyan mane yen bi navê Farsah (Varsak) dijîn. Ew gelê çiyayî û eskerên Kozanoxûllari ne. Elên li keviya çemê Ceyhan jî eskerên wan in. Ew èlên han havînan diçûne nava Anadolê û zivistanan jî li Çûkûrova di¬man. Yanê di navbera Kozan û Edenê de. Ew êlên mezin: Avşar û Sarkintili bûn. Yen biçûk jî: Kirintili, Lek û Hecîlerê Kurd bûn. Ew Kürdana pir şervan û talanker bûn. (S3"12ü) Bala xwandavana bikşînim ku ji bo êlên girêdayî Leran peyva Kurd bi kar tê. Yanî di qeydên Osmaniyan de êlên wek Kurd derbas dibin re, eger mirov bibêje êlên Ler in raste. Nehiya Hecîler bi deşta Amîk re cîrane. Li vir êla bi navê Qerefakili dijî; ew jî hov û asî ne. (83 128) Hîna jî li na- venda Anadolê gundê Qerefeqiyan heye. Ew jî dîtineka cûda tîne holê: Ji wê em dizanin ku Tirkan êla Şexbizin wek F/Varsak binav kirine. Ya din têkiliya wan û Kozanoxûllari ye. Ya herî girîng jî ewe, ku di dema Selçûqiyan de ew hatine. Ji bo wê jî sê alternatif hene:

1- Ewên bi Kurmancan-Şadiyan re yanê ewên li Arran, ji ber Tirkan revîn, hatin Anadolê. Berê li dora Qastamonû paşe jî çûn Çûkûrovê.

2- Ew Kürdana wek Şivankaran dihatine binavkirin, di derdora salên 1200 an de ji dora Urmiyê hatibûn. Ew dikare bi ya yekemin ve jî bibe alter- natîfekî û em dizanin ku di sala 1357 an de Sinop û Qastamonû di destê wan de bû. Mümküne ew du şaxûn Şûxbizinan bin.

3- Ew ji Loristanê bi êlên Avşaran ve tevhev hatine bakûrê Sûriyê. Têîddea kirin, ku di şere Çaldiranê de (1514), 3êxbizinan alîkarî dan Yawûz û pişti şer ji wan re Seçere hatin ava kirin û di wan de hat nivîsîn ku ew: "Ewladê Resûl Seyyîd" in û li kudeiê bixwazin dikarin nîştecîh bibin. (y2-7)Seçere raste, lê ji bo wê hewcedariya alîkariyê ne pêwîste, yan din jî, li ku bixwazin bi cîh bibin jî bi min zêde rast nayê. Lê dibe ku wê demê Yawûz destûr dabe ku bên navenda Anadolê; lewra têkiliyeka

baş di navbera wan û dewdetê de xuya dike. Lê nayê wê watê ku ew her tim wiha bû. E w ji bo demeka kin dibe ku mümkün be. Lewra li ser Şexbizinûn Anadolê jî gelek fermanên komkujiyan û bicîh kirinê hene. Yek ji wana ev e:

Di sala 1576 an de fermanek heye, lê di wir de ne diyare ku ew li ku dijîn. Dibe ku cîhê wan Çukurova yan jî dora Elezîz û Palu be. Ferman vviha ye: Ji Begêbeganê Mereş û ji Qadiyên Samantû, Goksûnê re! We ji min re name şandiyd ku Danişmendiyan drîşe Avşaran kiriye. Dema tu çûyî parastina Wane, ji ketxûda yê civata Avşar Recep, Behrî û Kuçuk Minnet ha ti ne û ji kethûdaye civatên Tirkmanî Danişmendlu û Lekvanik Zekeriya û Xûdawerdî re girêdayî 400-500 siwarî batine, malên wan talan kirine û şeş kesên wan kuştine.. .Sal 989-1576. (l6] 4Â) Wekî bere jî min nivisî di sala 1578 an de ji bo Reşiyân li Meletî jî fermanekabi vî rengî derxistibûn.. .Di vê fermanê de tişte dine bala me dikişine ev e: Gelo ji bo Şûxbizinan dibêje Danişmendî an Şexbizinan bi Danişmendiyan ve tevhev ûrîş kiriye? Gor dîtina min ji Têrîkiyan re Danişmend tê gotin, lê dibe ku ji bo Şexbizinan jî bi kar dihatiye...Pişti vê tarîxê jî jêder nîşan dikin, ku Şûxbizin li Çorumê bûne. Dibe ku berê jî girêdayî wê eyaletê bûn û erîşî Avşaran kirine.

Ji bo tamîra zilma li Danişmendan! Tirkmenên Lekvanik aruzu hal kirine, ku we ji bo eskerên Islamê pêne qenter (her qenter şeş hdştir e-Ş.R.) heştir û 500 mivên reş xwestine. Dema ev fermana gihîşte deste we, miyên ku te ji wan sitendibûn dîsa vegerîne û zilmê li wan meke! Sal:1019-1606. (,M64) Di vê fermanê de jî navê Danişmend bi gîştî tê xuyakirin, dibe ku di nava konfe¬derasyona Danişmend de federasyona Lek-Şbxbizin jî hebû.

C. Turkay dinivîse, ku Lekvanik-Lek-Farsah-Varsak-Şexbizin di salên 1600 an de li Çorûmê dijîn.0601 Orhonlû jî dibêje: Cemeetên Lekvanik li seneaxa Çorûmê diman (XVI), sê civatên girêdayî wan li Rûmelî ne, di nava navçeyên Malkara û Kavakê de belav nîştecîh bûn. (90'l8) Ew kîngê û çawa çûnê em niza- nin. Ew qeyd gelek girîng in, lewra: di destê me de secera Şêxbizinan heye, ew cara yekemîn di sala 1622 an de hatiye pejirandin.

Seçere bi geleknavan destpèdike: "...Seyid Şex îlyas-lawikêSeyid Şêx Xizir, lawikêSeyid ŞexYûsif, lawikê Seyid Şdx Hûsênlawikê Seyid Mihemmed Mûsayê II vê lawikê Seyid Ibrâhîm el Murtaza- lawikê îmamê hîman El Mûsa Kazim Imam- lawikê imam Cafer El Sadiq, lawikê Imam Mihemmed El Baqir Imam Zeynel Abîdîn, lawikê Elî Seyidê Bextewer torinê pêxember Eba Abdullah Hûsenê kur şere serketî Elî lawikê Ebû Talîb ku pêxember gotiye: " Ez bajarê zanînê me û Elî deriyê uv ye". Riza xwedê li hemûyan be û em ji bereketa wan xêr û xweşiye bibînin. Bereketa wan li ser me hebe, li dinya û qiyametê Xwedê tu heşra me di nava wan de bike selam û selatên Xwedê li ser Seyyidê me baştirîn mehlûqê Xwedê û li ser alê wî hemya Xwedê tu lime û li hemû ummeta Mihemmed xweş bibe. Naveroka wê dara jiyanê, di 10 parçe kaxezên ku bi hevre hatibûne zeliqandin bu, ku ev edet e. Ji wan 5 parçên beşa yekê ye û li ser wan nesebên pîroz hate nivîsîn. Lewra ev destura bo hemû neseba digel îmza kirine û 5 parçên kaxizên din ku bi hevre zeliqîne, meqseda me li mvîsana wan ku 62 nav (yan jî 62 xet) li destpêkê heta dawiyê têde ne û me nivîsîna wê temam kir di roja 2 ye meha 11 Muherremulheramê sala 1047

Wekî tê tespit kirin, cama têkiliya Şexbizinan û Osmaniyan re başe, lê evv Kürdana jî, ji bicîhkirina bi darê zorê para xvve distînin. Di sala 1691 an de bi Reşiyan ve tevhev û bi darêzorê ew li Rakkayê hatin bi cîh kirin. Wê demê em dibinin ku çar berên wan hene:

1. Heciyan.

2. Akbaş: Ji Rakkayê hatin Anavarza-Edenê, lê dewletê di salal699 an de dîsa şandin.

3. Kizil Koyûn: Kizilkoyûnlû yen girêdayî Lekvanik, li sala 1721 di navbera İznik û Sapancê de bi cîh kirin; paşû li Qeremursel rastî êlên bi cîh bûnî jî hatine.'90-109)

4. C/Kirinti. (160)

Di beşen derbasbûyî de jî me qal kir, ku Reşî di sala 1697 an de vegerîn û xuyayê ku Şexbizin jî vegerîne û beşek ji wan çûye Edenê û çiyayê Anavarzê. Di sala 1721 an de ji bo Lekvanik û Kizil Koyûnlûyan herêma Anavarza hatibû tayîn kirin. Ji Lekvanikan berê Akbaş li Rakkayê hatibûn bi cîh kirin, lê ew reviyan Anavarza-Adanaye; ji wir jî di sala 1699 an de rakirin û dîsa şandin Rakkayê. (9ü'81) Dewletê beşekî ji wan li Iznîkê û beşekî disa şandiye Rakka û beşek jî hate Haymanayê. Ewên li Rakka, agahiya me li ser tune, lê îhtîmaleka pir mezine ku piraniyan ji wana fîrar kiribin. Li ser bicîh kirina bi darê zorê û şere bi Osmaniyan re gelek kilam hene, lê em tenê çarînkî binivîsînin:

Di vê stranê de Kurdên ku derbas dibin gereg Şûxbizin bin, lewra Avşar jî Kurd in, lê di belgeyan de nave Kurd carna ji bo Kirmanca-Zaza carna jî ji bo Lekan tê nivîsandin. Di vê kilamê de îskana bi darêzorê tê qalkirin û ew Kurdên derbas dibin jî li Edene-Kozanê nîştecîh kirine. Gundên xwe ev in: Aslanli, Hayvali, Hecîler, Uçdût û Hamam in. Gelê wir dibêjin "em ji Xorasanê hatine û navê me Kurdên Lek û Kirinti" ye. Di belgeyên dîrokî

de bi navên: "Lekwanik Ekradi" û "Lekwanik" û "Tedavû Kirinti û JJeciyan" sê camaat derbas dibe. (99‘l2) Berê ferman hatibû dayîn, ku hinek ji Lekvanik li dora Çemê Belîh bi cîh bibin; lê ji ber ku cîh nemabû, ji wana 466 kes li nehiya Riha-Çîtîlî bi cîh kirin. Lek û Yîva li Akçakalê, qebîla Akbaş li gundê Maxarcik, Hecîler li gundên mîna: Koprulu, Harmanlik, Celavend Kûyûsû, Kizilorûç, Bexdat Vîrani, Höyükler û Bozorûçê bi cîh kirin. Ji bo ku li Rakkayê cîh nemabû, Kizilkoyûnlûyên Lek li Rihayê li gundên mîna: Kizilca, Guneyvîrani, Kaab Dexîrmenî, Göbeklere bi cîh kirin. (90'62) Piştî vegera ji Rakkayê em gelek fermanan dibînin.

Ëlên mîna Gungordıı, Delîlî û Kirintili 400 şakı, du-sê sal in ku li deşta Develiye nîştecîh in, di sala 1699 an de xwestin bişînin Rakka û li wir nîştecîh bikin. Lê ew neçûn û di navbera Bor, Nîxde, Urgup, Ulûkişla, Kaymakli, Kayî û Erexlî de diğerin, zilim li gel dikin û bênderên wan talan dikin. Di sala 1702 an de, Begê Beganê Mereşâ Reşî Xelîl Beg re fermanek hate şandin, ku wan bişîne Qibrisê. (,5647) Dulqadir li navbera Kinik û Berendiyê bi cîh hatibûn ki¬rin ku baca xwe bidin, lê ew qewlê xwe neanîn cîh û bi Lekvanik ve bûn yek û li Kurt Kulaxiyê örîşe İsmail Paşa kirin û malê wî talan kirin. (156'50) Koza- noglûyê li Mereşe nîştecîh re hukum e! Berendiyê ji ela Kinik ên li Zulqadir rûdiniştin û bi çandiniyê re mijûl in ji deh salan vir ve ew baca xwe nadin û bi mafê xwe ne razî ne. Li wê herêmê, ew talan dikin û mirovan dikujin. Ew bi Ekradê Lekwanik re îttîfaq kirine û li herêma Kurd Kulaxi erîşî İs¬mail Paşa kirine û ceseretê dane rêbiran. Ji Waliyê Qeremanê Hesen Paşa ji bo wan ceza bike re wezîfe hatiye dayin. Tu jî meriyên xwe bi çek heyne û here alîkariya wî, sal: 1118-1705. (161‘1M) Gor Niebuhr, Lekvanik di sala 1766 an de li Sêwas û Enqere 1000 kon bûn.'156-61’ Di sala 1703 an de xwestin ku li Ana- varza bi cîh bibin lê dewlete qebûl nekir û bi malê xwe yen 6000 qûriş dikin ve şandin Rakkayê. Pir hindik li Rakkayê bi cîh bûn; yen din

belav bûn. Ji wan 500 xane li cem torinê Pehlîwan, 500 xane li cem Taban, Danişmend û Ketîş-oglû û hinek jî Salar-i kebîre ji Boz Ûlûs man/1*611 Ew hevoka dawî ji bo me pir girîng e: em ji wê fêhm dikin ku di nava Boz Ulûs de Têrikî û Danişmend hene. Yanê Danişmendoxûllari Têrikî ne! Sala 1726 an li alî Newşehîre, hinek ji êla Lekvanik û Kirinti bi cîh kirin. Ji êlên din nêzîkî 2000 xane bi cîh kirin. (156 I30)

Ji waliyê Heleb û Rakkayê wezîr Yûsûf Paşa re! Me ferman dabû ku êla Afşaren Receplûyê ekradê ji cîhê xwe rabûne û niha ew li Qeyserî û Zamantiyê ne. Ekradê Lekwanik jî ji cîhê xwe reviyane. Boybegê Receplû Bekîr û Mûsacalû û begê Lekwanikê hatine Stenbolê û ji yen li Rakkayê re jî name nivîsîne ku ew wan jî bînin Anadolê. Hetanî ew li Rakkayê bi cîh nebin, gelê li wir rehet nabe. 500 malên wan li aliyê Rûm di nava Pehlîwanliyan de ne. 500 malên xwe li nava Tabanliyên Boz Ulûs, Danişmend, Avşar û Ketîş Oxlû de ne. Ekradê Lekwanik jî li sencexa Qayseriyê li navça Develî, Harmancik, Yahyaiû û nehiya Zamantiyê ne. Ew hertim di nava rêbiriyê de ne...Lekwanik û tevayî Kirintili, Hecîler li Develûyan li cîhên xerab bûne; Kizilkoyûnlû li sencexa Qirsehîrê û navça Silêmanli; civata Akbaş li Axbe û Boxali ya Edenê bi cîh bibin. Ji ber ku ji Rakkayê reviyane baca wan hersai bê girankirin.,.sal 1124-1711. (16M46)

Li ser dîroka Lek-Lera gelek jeder qala parçebûna wan û nakokî û §erê mezin ên di navbera wan de dikin. Ji bo wê, Lekên ku hatibûn Anadolê û bi yen 1İ cîhê xwe mabûn û yên çûbûn dora Derya Kesk ve dîroka xwe dem nêzîke cûda ye. Eger mirov Bextiyariyan jî bide ser wan ewê hîn zêde belav bibe. Heta vêderê me beşek ji dîroka ewên ku hatibûn bakûrê Kurdistan û Anadolê, da; ewên li rojhilatê Kurdistanê mabûn jî xwedî dîrokeka hîn dewlementir û

xwedî dewlet in.

Gor "Tarihî Alem Ara" Lek, bi fermana Şah Ebbas re li Loristanê bi cîh bûn. Ela wan a bi navê Silsila berê li rojavayê Kirmanşah-Mahidestte rûdinişt. Rabîno jî dibêje: Şah Ebbas, jibo ku hêza Well Hasîn Xan bişkene Lek ji Qefqasya anîn û li bakûrê Loristanê bi cîh kirin. Di dema Qaçaran de gelek êlên Lek belav bûn; Zend hema hema ji hole rabûn.004'60' Izady jî koçberiyeka berovajî wê dide xuyakirin. Li Xorasanê Kürden Yarisanê ku bi Lakî diaxivin jî hene. Ew di nav sedsala 18 an de ji alî monarşiya Afşar ve ji başûre Kurdistanê hafine koçber kirin. Kerîm Xanê xanedana Zend li cîhê Afşaran avakirî jî ji wan Kürdana bû.*154'39) Wekî xuya dike Zend malbateka ji Kurdên Ler-Lekê ye. Ew Kurdên bedbext ji vir birine wir ti caran rûyên rihetiyê nedine. Şah Ebbas bi xwîşka serokê Lor a biçûk Şahwerdî re zewicî û keça pismamê xwe jî da Şahwerdî. Ebbas jî Beyat an Uxûr Beg şand ser Hemedanê û ew jî bû sebaba şere Ebbas û Şahwerdî. Ebbas, Ebbas Mehdî Qulî Siltanê Şamiye neviyê Oxûzwar Siltan danî ser textê Xuremabadê.<157 l04) Şah Ebbas Atabekê Lore biçûk Şahwerdîxan îdam kir û şûna wê derbasî sîstema walîtiyê bû. Qaçar Axa Muhammed hinek êlên Lor şandin Qezwînê. Şahdn Qaçar ji Loran ditirsiyan û ji bo wê tim û tim serokê êla Lor li Tehranê digirtin. (9S194) Ew Lor-Lekên şandibûn dora Qezwînê, hîna jî li başûre Derya Kesk li herêmên çiyayî dijîn.

Di sala 1160 (-1747) an de Nadir Şah li Xorasanê hate kuştin û artêşa wî belav bû. 4000 esker di bin fermandariya Ahmet Xan de li Afganistan kişand Kandahar. Li eyelata Bextiyarî, a^şa dibin fermandariya Elî Merdan Xan û êlên li Zagrosan de yên mîna Zend û Feylî-Lor guhdarî Adîl Şah ê piştî Nadir hatibû nekirin û xwe kişandin Zagrosan. Heta dema Zend ew parçabûn dewam kir, heta ku dewleta Zendê bi hêz li rojavayê Tran û kraltiya Afşare xwe li lV^hedê bi rêxistin û merkezî kir. Artûş di dema Kerîm Xanê Zend de ji êlên mîna Lor, Lek û Kurdan pêk dihat. Ew

Bextiyariyên Şîa, Feylî, Lor, Zend û Zengenê, Vand û Kelhorên ji Zaxrosan Hemedanê bûn. Ji sala 1760 an bi şûnde, a^şa wî bi Tirkmenên Qizilbaş (Afşaren ji Urmiyê, Qaçarên ji Astarabad), Kurdên Tirkiyê ji Ezerbeycan (Dumbelî û Şikakî), Erebên ji Daşteştan û Iraniyên ji Ler û Kerman hîn bi hêztir bû.

Di artêşê de:

Lor û Lek (Feylî, Zend, Zengene û hwd) 24.000

Bextiyarî 3.000

Ji Pers a Iraq 12.000

Persên ji Xuzîstan û Daşteştan-Ereb 6.000

45.000. (172'507)

Berê jî me gotibû ku Qaçar Kurd in û bi texmîna min bi giranî ew Lek in. Di dema koçberiya Tirkan ya berbi rojava, ew jî hatin Anadolê. Binemalên wan hîna jî li Torosan hene. Yalman dibêje: Li zozanên Torosan ez nêzîkî li 300 konan geriyam, piranî Qerehecî û Qaçar in. Ji Qereheciyan Elî Axa dibêje: Em di sala 1862 an de ji Aydinê hafine. Beşek ji me li bakûrê Edenê bi cîh bûye,

beşek li Ceyhanê û hinek jî li çiyan koçber in. Qaçar li çiyayê Bûlxar-Toros in. Li cem wan keçikên qenterê koçberan dikşînin re dibêjin "Aladorlak" û ji serokên koçê re jî dibêjin "Savranbaşi".<ıu7'2h) Mezinên Reşiya jî digotin em bi kesê qenterê heştiran dikşinin re dibêjin savranbaşi. Navê Qaçar jî wiha derke- tiye hole: Di şer de, kesên ji êla Qaçar e li pûş erîşî dijmin dikirine û ji nişkeva jî vedikişine û rola rêve dikirine û bi vî awayî dijmin dikine kemînê. (,07'26) Yanî di tirkî de tê wata kesê revok.

Lê Nîkîtin dîtina min ê li jor pûç dike û dibêje: Qaçar bi Zendan ve dijminên hev bûn. (12"308) Di nava êl û zendekê de jî dijminatî dibe, lê wek min

gotî ez tam ne bawerim. Ji wê komê Şêx Elî, keleyên dora Derya Kesk girtin û bi Kerîm Xan ve bûne yek. Kerîm Xan Zend di sala 1758 an de bi Hikumeta navendî ya Iranê re şer kir û dewlet têk bir. Xwe wek wekîlê Şah û bi vê re dewleta xwe îlan kir. (100'41) Dema Kerîm Xan Zendê Kurd (1760-1779) texte İran kire bin destên xwe, Qaçaran jî bi alîkariya Ârdelan û Mukriyan ew têk birin. (12 30fi) Mixabin disa şeıe Kurdan yê bihevre li wir jî derdikeve holê û dibe sebeba lewazbûna dewletê. Dewlet di alî aborî, huner, tîcaretê de gelek bi pêşket û gelek êlen Kurd jî li Şîrazê bi cîh kirin. Lê di sala 1789 an de Xan ji nişkeva mir û di navbera kurê wî Abdul Fetah û serleşker Alî Murat de serê hundirîn derketin. Bi ser wê aloziyê ve Axa M. Qaçar jî ji hepsê revî û çû Mazenderan, bi Kurdên wir ve eriş kirin. Leşkeren Qaçar Şîrazû xirav kirin û şevvitandin; çavên 20 000 kesan kor kirin, sal 1794 bû.,l00'41) R. Blaga jî rewşeka cüda diyar dike: Lek di qirnên kevn de ji bakur ve hatin waren xwe yen nihai95" bS) Li başûre rojhilatê Kirmanşahe li herêma Hersin Osman Vend, Celalvend û Dorûd Faramanê çend malbaten Lek Zend dijîn. Ji Lekên li Hemadanê komek di dema Sefawiyan û Qaçaran de derbasî Nehawend, Melayer û Tuvîserkan kirin. Ew li Bakirabad, Hactepe, Huseynabad, Ruknî, Abad Mafî, Miyan, Gozaz û Jalal Miyankuh dijîn. (9515H) Kerîm Xanê ji êla Zendelekî ye, ku ew êl ji alî Nadir Şah ve koçê Xorasanê hatibû kirin. Ji gelek şeran bi şûnde Kerîm Xan Tehran, Esfehan, Erak û Şîraz di sala 1754 an de bi dest xist, Sê mehan Iran Urmiyê îdare kir. Di sala 1797 an de Bayranvendî û Bacîlanî li hember malbata Qaçar, li dora Muhammed Xanê Lek Zend civiyan û ketin raperînê ku dewletê ji dest bigrin. Kralê Qaçar Axa Muhemmed Han Zendiyên Gayenî, êlên mîna Sedvend, Ebûlmelikî, Kelhor, Leşenî û Korzobar ajotin navbera bajarê Qûm û Sava. Di wê demê de Lekî hem a hema ji holê rakirin û hemû belav kirin. (95161) Li Kirmanê, li dora bajarê Sicanê Afşar û Lek hene. Li Xorasanê: Nadir Şah

çend êlên Lek û Lor li Deregez, Destger û Kepekan bi cîh kirin. Li Tehran-Veramînê Lek hene. Li Erak-Siltanabat êla Zendelekî heye. Li Gîlanê: Mekarud, Tildere, Kecur, Kelardeşt, Geykelayê Lek dijîn. (9V158) E. Cemîlzade jî tarîxeka din dide: Kerim Xan Kurd bû; ji êla Zend bû, di sala 1760 an de padişahı ji destên Nadiriyan derxist û bû padîşahâ îranê. Padîşahiya wî 20 salan ajot û bajarê Şîraz paytextê xwe bû. (9'216> Êlên Zend Lakî dengdikin û îro li Kifrî û Malayer dijîn. Taybetmendiyeka Zenda jî ew bû, ku jin jî tevlî şeran

dibûn. Bûka Kerîm Xanê yekemin bi wî re mil bi mil li hember Afganan şer kir. Zend ji olên cüda re pir bi hürmet bûn. (154 120) Evv jî nişana wê ye, ku ola wan a kevn ne Islame. Konfederasyona Zend di navbera Hemedan û Malayîrê de dijî û di dema Nadîr Şah de li Xorasanê mecbûrî jiyanê bûn lê ji mirina wî şunde vegeriyan welatê xwe. Yen ku venegerîn jî li Gîlanê man.

Izady dibêje: Li Gîlanê konfederasyona Amarli heye, ku di navbera Deyleman, Siyahkal û Şahrûd de dijîn. Şamî (Şamkan), Devali, Şakûlan û Stacli (Tstacli) hinek ji wê konfederasyonê ne û sunnî ne. Ew êlên ne di wê konfederasyonê de jî Bacalan, Çiginî (Kurmanciya xwarê), Çemîşgezek (Dimilî), Celalewend, Kakî, Kiyasvend (Lakî) in. (154'164) Lek, di navbera Abivard û Çahçaha de dijîn û bi Lekî deng dikin. Di heman herême de Zend jî hene ku bi Lakî deng dikin û Yarîsanî ne. (154 163) Raste ew êlên A/Emerlûyê ji mîrîtiya Dulqadiriyan e û ew nêzîkî Reşiyan e, yan jî şaxekî wan in. Di alî civakî, ehlaqî û fîzîkî de wek Reşiyan e û hinek ji wan jî dibêjin "em Sêvikî ne". Ela Şamî, ji Sêvikan e. Lek û Hewramanên li wir jî min dîtin, 50 km bi rû rûbar de 50 gund hene ku ji vê re Qiyasawend jî tê gotin. Bajarê Lûşan (Lowshan) jî 150 000 hezar kes dijîn. Emranlû li Mazenderanê herêma Ester Abadê dijîn û di destpêka sedsala XIX an de 4000 kes bûn. Li Qezwînê jî Emvarlû dijîn ku hejmara xwe 5000 kes in.

(131'444) Elên mîna Zohap û Bacilanê Lek di wê baweriye de ne ku ew ji Mûsilê û di dema Şah Ebbas de hatine ku şuna Kurmancî êdî bi Lekî diaxifin. (95 162) Piraniya Lekan Şîa û Ehlî-Heq in. Navenda Ehlî-Heq navça Lekestan-Delfo ye.

Dîroknûsê Kurd M. E. Zekî û C. Turkay li ser belavbûna Lekan lîsteyeka dirêj didin: Lor, Bextiyarî, Goran û Lek Kurd in û ji heman rîşeyî tên, li Iranê rudinên lê heta Meletî, Riha û Me^ê jî hatine.09251 Li dora Enqere 120 malbat in, şaxekî Şêxbizinan li Kerkûkê ne, Kurmancî deng dikin. (19,88) Ew dîtin ne raste, piraniya Şexbizinan Kurmancî dizanin lê ew esas bi zaravê Lekî dengdikin. Li rojavayê gola Qoçhîsarê dijîn, bi piranî li dora Qerecdax-Kûlûyê ne. (19'189) Piranî li Haymanayê ne. Şexbizinî/ Şexbizinli/ Şexbûzûnî li: Kütahya, Iskîlîp-Çorûm, Palû, Amed, Gey vê-Kocaeli, Haymana, Enqere, Mêrdîn, Rakka, Erzirûm, Qastamonû, Çanqiri, Sêwas, Çildir, Qeremanê dijîn. (160 154) Çorûmlû- Çorûmlû Ekradî yan jî bi navê xwe yê din Ekradi Lek, wek konar-goçer Ekrad Yorukani Taîfesî derbas dibe û li Mêrdîn, Çorûm, Bozok, Çanqiri, Sêwas, Teke, Kilîsê dijîn.060'3041 Wekî tê diyar kirin gelek belav bûne. Êla Şûxbizinî ya girêdayî civata Hivedanli (Hayvadanli) ji sûlala Imam Mehmet-el Bakir û Zeyn-el Abidin û Şêx Selheddîn in û li sencexa Enqere hatin bi cîh kirin.060"4181 Ela Hewêdiyê heye û ew Kurmanc û Ezîdî ne. Li Hindistan, Xorasan û bakûrê Kurdistanê belav bûne. Têkiliya wan bi Şexbizinan re nîne. Lê ew binemala ku tê qal kirin, di secera Şexbizinan de jî heye. Kiran-Kiranli-Kirantali ji êla Lekvanikan e. Li: Sêwas, Aydin, Amed, Çanqiri, Rakka, Bîga, Qirşehîr, Samsûn, Bafra, Canik, Çorûm-Îskîlîp, Nîxde, Qereman, Qonya, Mereş, Kilîsê dijîn.060'5181 Cemeeta Velîlî girêdayî Lekvanan e û li: Nîxde, Qereman, Qonya,

Rakka, Çorûm, Çolabadê dijîn.U60‘758) Lekvan-Lekvanî-Lekvanik Ekradî li navça Dewelî ya girêdayê Nîxde û li cîhên bi navên Harmancik û Gezîlî

yê girêdayî Qeyseriyê bi cîh bûbûn. Li ali Dewelî diçûn zozanari. Yek ji êlên Tirkmenên ku hatine şandinî Rakkayê ne. Li: Rakka, Çorûm, Qeyserî, Nîxde, Sîs, Qereman, Mereş, Adana, Aydin, Qibris, Nîxde, Mereş-Zamanti, Anavarza-Adana bi cîh bûn.,160‘570t Kurdên Lek jî li kortala çemê Ceyhan û rojhilat û rojhilatê bakûrê Edenê dijîn.'154177> Ewê ku navê xwe derbas dibin kalê Şexbizinen li Anadolê ne. Beşekî din ê Lekan jî li Iranê bûn; yen ku berê çûbûn Qefqasya ji alî Şahe Iranê ve dîsa li Lekestanê hatin bi cîh kirin.

Nivîskarên ji êla Şexbizinî îddea dikin, ku ji bo çerê Çaldiranê alîkarî kirine, ji bo wê jî, ji Şexbizinan re sê ferman hatina dayîn ku li kuderê bixwazin lê bicîh bibin; ew fermana: 1756 û 1780 li Amed û ya din jî li sala 1815 li sencexa Enqere hatiye dayîn. Ez di wê baweriyê de nînim; lewra belge û fermanên di dest de hemû berovajî wê didin xuyakirin. Beşek ji wan me li jor nivîsî. Agahiyên din ên ku tên dayîn ne di cîh de ne. Lewra hinek Lek paşe tevlî yen li navenda Anadolê bûn. Beşekî Şâxbizinan heta sala 1800 an li Palûyê bûn. (9Z 7) Ali Delle jî dibêje: Kalê min Nasir ji Palûyê hate Haymanê. (92'8) Nazim Benlî jî dibêje: Em ji Palûyê 12 malbat hatin!92 n) Lerên li Navenda Anadolê, di nava xwe de bi çend navan tên binav kirin. Hinekan re Silenî tê gotin.

Bi koma li dora çiyayê Mangalê û gundên mina Mandira, Durutlar, Derekoy û Sarigol re Kelatî, Xewend û Jirkî tê gotin. Navê Kelatî balkêçe, mumkune ku ew ji Kelata Xorasanê hatibin û ew nava li ser mabin. Yên ji navça Palûyê hatine re "Palanı" tê gotin. Ji yên li Ewliyafaqi, Yaprakbayiri û Köseler re jî dibêjin "Ler". Li ser malbat, êl û serhejmara Lekan jî gelek dîtin hene:

Gorê Torî dinivîsine, êla bi wî navî û komên nêzîkî wan li başûre

Kurdistanê jî wiha ne: li Kerkük: Şeref Beyanı (Korakî, Emîrhan Begî, Azîzbeyî, Kahar û Nadiri), Delo (Camrizî, Pencankeştî, Kaşkehrizî,

Tarkondveysî, Kazaniye), Berzencî, Omermil, Tilşanî, Zengene (Faris Axa, Ristem Axa), Cebbarî, Eylanî, Talabanî, Şuvan in. Li Xaneqîn jî: Şex Bezinî, Palanı, Sûremin (Kelhorî, Totik, Memecan, Eyne, Anteri), Bacillan (Cumur, Kazanlû), Kahur, Geze (Sadaleguha, Baramserkala), Zende (Muhammed, Salih Axa, Ulan, Tahiran, Ganî), Ganî, Davvide, Salihî, Kakeyi, Kagenlû, Beyanî, Zerguş, Hilanî, Feyli, Gevazî, Neyrd, Havramı (Havram Taht, Havramî, Lihon, Merîvani, Çengî, Caf (Harûnî, İsmail, Azîzî, Mikaîl, Reşobori, Terhanî, Şatirî, Sadanî, Badagi, Başkî, Amola,Yûsuf Cani, Nevruli, Kemali, Bezdengehşî, Tavguzî, Gelalî, Reştmale, Biseri, Yariveysi, Şûx Ismaîlî, Tsaî, Sofiyevend), Reşder (Babkeraxa, Ebbasmahmudiaxa), İsmail Azîzî, Hemavendi (Beyzade, Reşavend, Remevard, Sefrevend, Sinebeser, Kafruşî, Piryayî, Cengi) hene. (38)

Nûserê Tirk E. Yawûz dibêje ew wek: Alan, Kak, Maman, Bitli, Becenelî (Peçenekli), Çuvarî, Dirik, Seki, Köşklü, Mirahur, Katird, Dinarli, Bala, Doşlû, Bacalan, Muhlû, Hanimli, Gündüzlü, Eşeklî, Sîtlî, Mankirevarî (bajarî) tên beş kirin. (l04'67) Tişte balkeş ewe, ku li wir Alan di nava êlên Lek te tene hejmar- tin. Wekî tê zanîn Alan bi navûdeng ji rojhilatê Uralan bi êlên Macar ve berbi rojava û başûr çûbûn. Lê piraniya wan Kirmanc-Zaza ne, dibe ku nivîskar tev- lîhev dikin. Beceneklî berê jî me gotibû ku Lek in û li bakûrê Derya Kesk dijîn. Navên êlan: Kelhur (kelgur), Tiloku (tilekli), Gulbahî, Koşkî, Şimşiri, Koregiyi, Cibraşî (Cibranli-şaxekî Qeregeçîliyên li Varto û Wêra^ehrê ne). (in4 34)

Subayê Ingiliz Mark Sykes jî dibêje: Şex Bizinî 4000 malbat in û êlêka pir şervan, hov û şölankar in. Siwariyên pir baş in û silaha martini bi xwe çêdikin. Ji Kurdên Baban in. (100'175) Ji şervaniyan Şêxbizin re gotin nine lê ew ne ji Kurdên Baban in.

Birêz Mehmet Bayrak (Ozgur Politika 2005.02.09) nifûsa bajarê Mûsil û Şehrîzor (Kerkük) ên di sala 1905 an de dide û ji bo Şêxbizinan jî dibêje ku

li bajarê Hewlêr 2710 kesên ji wan hene. Dîsa li Kerkûkê êla Şerefbeyanî dest nişan dike û şaxön wê jî wiha dinivîsîne: Korakî, Emîrxanbegî, Azîzbeyî, Kahar, Nadiri ne. Li Xaneqîn jî Şâxbizinan işaret dike. Ziya Gokalp jî dibêje: Lor di nava Iranê de ne. Şêx Bizin ji Sorane û ew li her derê hatine belavkirin. Li Amedê, Trabzonê, Enqere jî mirov vê eşîretê dibine. (22) Dîtineka bi kêmasî ye, ji ber ku Şêxbizîn ne Kurdên Soran in.

M. E. Zekî: Li Xaneqîn 700, li Erzirûmê 450 malbat Şêxbizinî radigihîne û dibêje beşekî wan li Kerkûk-Tortayîn in. Koka navê êla Lekkerdî digehejê Lekên li Edenê dijîn. Qala Palaniyan jî dike û dibêje ew 350 mal in, bi çandiniyê re mijûl in û wiha beş dike:

A. Nêzîkî Enqerê rûdinên, 120 malbat in, şaxekî yên Kerkûkê ne. (19188) Li Qerecdax-Kûlûyê jî hene. (,9189) Gor mezinê Şêxbizinan Hafizê Sadûllah ew li destpêkê li Qerecdaxê-Kûlû-Qonya bi cîh bûne û piştre çûnê dora Haymanê.

Mezinê gundê Tirko (Canbeg) jî dibêjin berê li şûna gundê me Lerî hebûne, ew ji ber nexweşiya neynik-reşiye çûne. Beşekî Ler jî ji wir çûne Adapazari- Gumuşova-Akyazi. Gundên giredayî Akyazi ya Adapazari yen Ler navên xwe wiha ne:

1. Bêdil îsmo
2. Yortan (Yüksel)
3. Teke Tapan (Çeşmebaşi). Ew her sê gund wek Lek tên bi lêv kirin.
4. Hecî Iwîşgel (Kûm Kopru). Ew gunda wek Ler tê xwendin.
5. Kûtîpingal (Yazili Gurgen).
6. Potuklar.
7. Kûzîlixê (Kûzûlûk).
8. Caf (Caferanli).

Sexbizinên li Akyazi ya Sakarya - gundê Yortan

Wekî xuya dike hîna jî navê Caf di nava wan Kürdana de zindî ye û ew ji bo tekîliyên dîrokî girînge. Niqta din jî piraniya wan gundîyana xwe wek Ta¬pan û Şexbizinî jî bi lêv dikin. Giredayî Sûlûoava jî gundê Armûtlû heye; ji 180 malan pêk têû gundî dibêjin: "Berî 150-200 salan em ji Haymanê hatine..." Bi vê re giredayî em hinek gundan jî li Duzcê-Bolû yê dibînin. Li taxa Duzcê yê bi navê Camîbekîr bi temamî Ler dijîn. Gundên giredayî Düzce yê ku ew koma lê dijî jî ev in:

1. Balica.
2. Bahçe.
3. Paşa Konaxi.
4. îçmeler.
5. Tinaz.
6. Mamûrê.

Ew gundana hemî xwe wek Caferanli didin nasîn. Lê niqta balkâş ewe ku mezinên wan gundîyana bo nijada xwe digotine: "Kurdî" û bo zarava xwe jî digotine: "Kurdekî". Bi dîtina min navê ji bo vê komê yê herî xweş û bi wate

ew e. Yam bi lev kirina wek Ler an Lek nave wan ê zendê ye. Şexbizin jî navê êlî û heiêmî ye, ku tiikeve nava Lek an Ler. Le nave Kurdî û Kurdekî ye ve kome, di nav netewa mezin de yê herî rast e. Eêwîste ji vir û pêde em vî navî bikar binin.

B. Li Leylakê rûdinên ıı 1.000 malbat in. (,y 192)

C. Beşek Lek li bajarê Salmas (bakûrê Ûrrniyê) dijîn û ew ji Şîraze hatine. (,y ,93)

D. Lekkerdî: Li Edenê tevlî Belikan û Delikan dijîn û tevhev 10.000 şînî ne. (19‘

IS7)

E. Nêzîkî Erzirûmê rûdinên, 450 malbat in, beşek ji wan li Tortayine, ew jî nişan dide ku wana şaxekî Şexbizinen Kerkûkê ire) Ew Tortayîn divê bibe T oyçayir-Haymana.

Li wê herêmê gelek malbat ji Erzirûmê batine. Gora dîtina gundiyan, berê ew havînan diçûne Aydin, Samsun û Antalya yê. Gundtyên ji Derekoy, Mandıra, Durutlar û Kayabaşi re hinek dibêjin "Kerküklü" û binek jî dibêjin "Sîwerekî": Gorî efsanê du bîrayên bi navê Xelîl û Îbrahîm ji Varto tên mala Kose Abdullah-Haymanê ji gundê bi navê xwe Kose Abdali (Yurtbeylî). Di wê demê de komek rêbir tê mala Kose û ji wî xerecê dixwazin; ev herdu xort li dij derdikevin û bi wan ra dikevin pevçûnê. Di dawiyê de xort komê tek dibin û xwe bi apê xwe didin nasandin. Apê wan keçên xwe dide wan û li wan gundana bi cîh dike: Balçikhîsar, Baltalîn, Yenicik (Torûn), Sûflîbala, Yurtbeylî, Sînanli, Bostanhoyuk, Dîkkûlak, Sazaxasi ji heman milî ne. Kaltakli, Bahçecik, Încîrlî, Gedîk, Evcî, Harhor jî ji vê êlê ne. Gor lêkolînên min, mirov dikare Lekên li Anadola Navîn, gor herêmen jê hatî bike çar beş:

a- Sîwerek: Gundên mîna Kose Abdali, Sînanli, Şaîloa, Torina, Baltali, Bostan Hoyuk, Balçik Hîsar, Dîk Kulak, Saz Axasi, Canimana û hwd.

b- Erzirûm: Malbatên hatine li gundan belav bûne. c- Palu: Sindir an. Ji wê komê re dibêjin: 'Talanı" . ç- Qastamonû-Sînop: Qaltakli, Yaprakbayir, Derekoy, Mandara, Sarigol, Emîrler, Xarxor, Gedîk, Qerepinar, Evcîl, Doxan û hwd...

Dîtineka cûda jî ji birêz Yeşîlgoz tê: Berî ku li Haymana bi cîh bibin ew

di nav êla Badilî de bûne. Badiliyan zivistan li Rakka, havîn jî li Ûzûnyayla û Erzirûmê derbas dikirin. bien girêdayî jî: Arşûvan, Ustûrgan, Çimgan, Azman, Had Kirli, Kurdukan, Mamavî, Mûdan û Atman bûn. Di nava wan de Kürden bi navê Lek/Lekvanik jî hebûn. Wek Badiliyan ew jî li zivistanê diçûn Akça Kale, havînê jî Çorum, Yozgat, Çiyayên Kîxî, Qerecdax, Erzirûm (Ispir). Ji bo Lekan jî berê Amed fikirîn ku lê bi cîh bikin lê wan nexwest. Bi ser vê de hemû li herêma Kizilca, Vîrani Kotî, Kaap Dexirmenî û Göbekli ya Rihayê bi dh kirin. Dîsa, êlên Acûran û Yivo (her yek 600 kes bûn) yen girêdayî wan li Akçakale bi dh kirin. (39) Ela bi navê Yivo belkeşe û di nav 24 êlên Oxûzan de navê êlekê wek Yiwa-Yîva derbas dibe ku ew in û li vir jî derdikeve holê ku ew Şexbizinî ne.

Piraniya êlê di sala 1800 an de hatiye Haymanayê. (921) Gelek mezinên wê êlê jî dibêjin "200 sal in ku em hatine û 150 sal in ku me gund çêkirine". Li Haymanê 29 gundên Şexbizinan hene. Wekî din jî li Enqere-Yenîdoxan, Kirikkale, Elmadax, Kaledk, Boyabat, Îskîlîp, Kocaelî-Geyve, Akyazi- Adapazari, Çerkez-Çanqiri, Merzîfon, Qerebuk, Bafra, Düzce, Gerede, Polatli, Kûlû, Erzirûm, Oltû, Narman, Şîran, Şam, Rakka, Iran û basûrê Kurdistanê jî ew hene. (921)

Di "Salnama Enqere" (1882) û "Qamûs ul Alam" ê de (1888) navê Hay¬mana "Nahiyeyi Şexbizin" û nifûsa wê jî 12170 mêr û 11674 jin derbas dibe. Gundên Şexbizinan:

1. Sindiran-1826/Yenîce
2. Horhor (Soğut tepe)
3. Bacihesar
4. Încîrlî
5. Yurtbeylî
6. Baxçecîk

7. Torin (Altinpinar)
8. Xewend-Alacik
9. Bostanigi
10. Qaltax-Kaltakli
11. Baltali (Pinarbaşi)
12. Qerepinar
13. Sazê
14. Mandira (Qereomerlî)
15. Şavlû (Sebîlî Bala)
16. Derekoy
17. Yergom
18. Qavax
19. Tîkkûlax (Yeşîlkoy)
20. Sa rigol
21. Sînanli-Sînay
22. Doxan (Eski Kişla)
23. Tabaxê
24. Dûrûtlar
25. Tolosman
26. Ewliyafeqîr
27. Gedîklî
28. Kelatî-Yaprakbayiri
29. Evcî-Cingil

30. Çayraz (tevlîhev)
31. Yamak (tevlîhev)
32. Canimana*
33. Dipdede*
34. Qere Kilîse (Qaraca Dere)*
35. Ewliya Çeşme (Soxuk Kûyû)*
36. Kaya Başi **

* Kûlû

** Polatli.«92-9)

Kale Şâxbizinan-Koseabdali

Kandemîrê di sala 1930 an de hatî Haymanê dibêje: Êla Sêxbizinî ji qebîlên wek: Xorasanli, Hawedanli, Herfodanli, Jirdikanli, Leranliyan pêk

tê. Ela bi navê Xorasanî jî îspate, ku ew ji wir hatine û Leran jî gotina gundiyên

çıran e, me Ii destpêkê gotî piştrast dike. Êlêka Kurmanc ê bi navê Hewêdî jî heye; lê xuyayê navê êlêka Şexbizinan ya nêzîkî vê heye. Di dema şere cîhanê yê yekemin de, li aliyê Baybûrtê 50 hezar Şexbizinî dijîn. Ji ber eriş û tirsa Rûsan hemû reviyan Anadolê. Bedrettin Dalan (şaredare Istanbûlê yê berê), rojnemevan Selahattîn Dûman û serokwezîrê Tirkiyê yê berê Bulent Ulûsu jî ji vê êlê ne. Heta îhtîmaleka pir mezine, ku serokwezîrê berê Bulent Ecevit jî esle xwe Lerî ye. Ji vê êlê gelek li Şam, Erzurum, Palu, Kütahya, Çanqiri, Mêrdîn, İskilip, Çerkeş Geyve, Bayburt, Qers, Şîranâ jî hene. Ahmet Cevdet Paşa yê Tirk zendên mina Lor, Bextiyari, Goran û Lek Kurd qebûl dike û dibêje ji eslê xwe ve li Iranê bi cîh bûne, lê beşekî ji wan li Meletî, Riha û Mereşe rûdinên. Ev koma bi navê Zend ê bi nav û deng e ji wan e.

Sala 1914 an de êlên mina Lek Selsele, Delfan û Tarhan li dora Nezeralî Xane ji êla Amrayî gihîştin hev û raperîn derxistin. Di heman salê de êla Bayranwend cendirme têk birin, Huremabad û Loristan bidest xist. Lê bi hatina Rûsan re ew reviyan Herroyê. (9’161) Di belgeyên Ingîlîzan ên di dema şere cîhanê yê duyemîn de wiha tê nivîsandin: Ela Şûxbizinî 100 sal berê, di serokatiya Melle Ebbas û Hecî Hemze de ji dora Zaxo hate Ze yê. Li herdû aliyên çem nêzîkî 50 gund (430 malbat, 70 siwarî 500 piyadê xwe hebûn) avakirin û lê bi cîh bûn. Kêm be jî, hîna malbat li Hewlêr û Zaxo dijîn. Wê êlê gelek caran li hember Tirkan raperîn derxistiye. Gundên xwe li Kerkük, Silêmanî û Koy Sancaqê belav bûne. (144'72)

Gor rapora îstîxbareta Tirk, Şexbizin li Kurdistanê: navça Oltû, Ispîr û Tortuma girêdayî Erzirûmê Şûhbizinî 1414 kes in, Kurmanc in, henefî ne.,l08'136) Li Wanê êlên Şâxbizinî yen wek: Karkî, Hecîmkî, Kirmizkî, Elîkî, Bekçî dijîn, lê hejmara wan ne diyar e.008’343* Li Xaneqîn, dora çemê Kûyê 600 kesên Şexbizinî dijîn û sunnî ne. (1(!8 358) Hatiye qeyd kirin.

Zimanî Şêxbizinan jî dikeve koma Lorî, lê yên li Anatoliyê zimanê xwe nêzîkî Kurmancî ne, ji bo ku demeke dirêj e bi hevre ne, dibe ku ew nêzîkatiya çêbûye. Yên li herêmên din em nizanin û ew cîhê lêkolînekê ye. Lê mixabin îro li Anatoliyê jî zimanê Lekî hêdî hêdî cîhê xwe ji tirkî re dihêle û ew jî cîhê xemgîniyê ye. Li peyvên jêr mirov dikare zimanê herêmî bide berhev:

Kurdên Sêxbizinî di sala 1997 an de dikaribûn çar bavên xwe bijmêrin; ew li Reşiyan heta 8-9-10 bavan diçe. Wek mînak: Hafizê Sadûllahê Elî (di sala 1997 an de 67 salî ye), Eliyê Memed, Memedê Qaraca, Qaracayê Qereman. Bavê dawî Qereman jî li gundê Kose Abdaliyê mirî ye. Di alî kevneşopiyâ de jî wekî Reşiyan e. Di alî kincan de, di alî govend, destar û olî de wek hev in. Tenê Şöxbizinî şafû ne, Kurmancên herêmê jî beşekî

mezin henefî ne. Li gundê Kose Abdali mezinan digot: dema kesek nexweş diket, kûlig qui dikirin û nexweş di bin re heft caran derbas dikirin. Ew li her cîhekî Anadola Navîn wiha bûye. Dîsa mezinan digot di xortaniya me de kesên nimêj dikirîn pir kêm bûn. Di edet û tevgera wan ê civakî de şopa Zerdeştî heta dema dawî jî hebû.

Kincên berê-Koseabdali

CANBEG

(Bexdilî)

Li ser navê vê kome ti agahiyên ku dilên mirovan rihet bikin min nedîtin û dîroka vvî navê jî ji 650 salan zêdetir naçe. Ew jî îşareta wê yekê ye ku ew nava piştre wergirtine û ew berê xwedî navekî din bûne...Dema li ser peyva Canbeg analîz bê kirin, derdikeve hole, ku ew ji Begê bi navê Can tê. Ew jî di nava Kurdan de kevneşopiyeke ku navê êlan an ji seroka/ê êlê tê wergirtin, an ji lehengekî yan jî ji herêmê... Li Anatoliya Navîn carna ji bo Canbegan navê Gawestiya jî derbas dibe, lê ew ne zelale, lewra carna ji bo hemû êlên li herêmê jî bi kar tê. Niha em li çend alternatîfan binêrin ka ew nav ji ku tê:

F. Sumerê li ser dîroka Beraniyan nivîsî dibêje: Ezerbeycan, Erran û Acemên Iraqê di bin kontrola Melik Eşrefe Çobanli de bûn (1356). (11M1) Li vir Çobanliyê ku navê xwe derbas dibe, ji konfederasyona Beraniyan e. Ji ber îdara wî ya xirav gelek kesan welat terk kiribûn. Ji ber wê hukumdarê Altûnordû Cani-Bek Han (1357) hate Ezerbeycanê ku gel ji zilma wî xelas bike. Eşref kuşt, lawikê xwe li Tebriz cîhîşt û vegeriya welatê xwe. (nM1) Bê gu man em nikarin niha îspat bikin an jî îddea bikin,

ku Canbegan navê xwe jî wî wergirtiye. Lê ew îhtîmala heye; bûyereka bi vî navî re têkildar jî di dema Memlûkan de xuya dike.

Baybarsê Memlûk di sala 1438 an de li hember Pezgewran derket sefera xwe ya seyêmîn. Sedama wê seferê yek jê ew bû; ku dixwest cara dawîn dijminê xwe yê kevn ê asî û maceraperest Memlûk Canîbak ûl Sûfî têk bibe...<114131) Pişti mirina Baybars, Memlûk li sînoran ketin tengasiyê û du mîrîtiyên bi hêz ava bûn. Ew Dulqadir û Remezanî bûn ku di navbera Osmaniyan û Memlûkan de bûn tampon.*114'1 î2) Ew herdû mîrîtî jî ji alî Kurdan ve hatin damezirandin. Memlûk Canîbak jî ne Ereb e, ew Kurde û piştre ji ber tirsa Memlûkan xwe davêje paş mîrîtiyên Kurd û ew jî dibe sedema aloziya navbera Kurd û Memlûkiyan. Piştî wî begî jî em yekî di serdema Sefawiyan de dibînin.

Di şere Çaldirane de, Safe wî têk çûn û gelek serleşkerûn Şah jî li meydana şer mabûn. Ew: Ji Ustacaliyan M. Han, ji Şamiyan Lala H. Beg, ji Afşaran Siltan Alî Mirza, ji Turkmenen Velî Can Beg (ji êla Kazakli ye), Mîr Abdûlbakî, Seyid M. Kemûne û Mîr Seyid Şerif miribûn.*112'361 Ji wana em dizanin ku Ûstacalî, Şamlî, Afşar û Tirkmen Kurd in. Ew êlên ku Safewî avakirin jî piranî êlên wan begana bûn. Velî Canbegê di wî şerî de mir jî, serokekî Kurdan e û îhtîmaleka pir mezine ku ew ji Qeremaniyan e. Lewra ew her çar begên dawiyê mirine hemû ji wê êlê ne, ew Kurd in û bingehên Sefawiya ne. Li vir mirov hîn zêde bawer dike ku êla Canbeg navê xwe ji wî begî girtiye. Ew yeka ji alî dîrokî, olî, civakî ve tê îspat kirin. Bi vê re girêdayî, di beşa Kurdên Xorasanê de jî min navê xanên êla Kîkî nivîsî bû û îşaret pê kiribû, ku têkiliya wan bi Canbegan re heye. Ew yeka jî ji vê tezê re îspateke.

Ji alî gelek nûseran ve te pêjirandin ku Canbeg şaxekî Kîkiyan e, yan

jî Kîkî bi xwe ne. Eger ew îddea rast bin, dîroka wan jî digihîje navenda Xorasanê. Rişvvanoglû dibêje: Di sedsaia VI an de li rojavayê Gola Baykal

zendekî bi navê Kîk-û dijîn. Paşe ew ketin bin destên Muku Xanê Tirk. Ihtîmaleke mezine ku Kîxiyê navê xwe ji wan heyna. Ew bi Xalaçan ve bira ne (128-27) Seferoglû jî dibêje; di sedsaia VII an de li Kuhîstana Xorasanê, Xalaç bi Kurdan ve tevhev wek koçer dijîn; bi pez û beşti ran debara xwe dikirinl91"1® Di vir de mebesta nivîskar di Kurdan de; yan Kürden Kirmanckî yan jî Lekî axêf in. Di erişen İslam en yekemin en lı ser Xorsanê de, nivîskarên Ereb vana hemûyan wek "Ekrad" nîşan didin. Li Hindistanê, demeka direj êlên Tirk (mebesta vvî Kurd in) bûne destbilatdar (1230-1321); ji vana Xalaçan tam 30 salan ew îdare kirine desten xwe. Di arteşa Gazne de, tîmen lêxistine hemû Xalaç bûn. Gaznelî hilweşiyan bi şûnde, cîhe wan Gûr-Lûxan wergirt. Gûr di navbera 1284-1304 an de dewlet bûn. Kîkî û Xalaç di dema erîşen Islamê de gihîştin hev û wek Gûrî derbas dibûn. (128 27) Wekî bere jî min nivisî Gûrî/ Gor dewleta Kurden Lek e û xuyaye ku ew demekê Kurdên ji zaravê din jî kirine bin baskên xwe. Al Masûdî (943) dema êlên Kurd dinivîse êla Kîkî û Curkan jî dihejmêre: Di navbera Mûsil û Ararat de Yaqûbiye û Curkan û nêzîkî wir Hemîdiye-Merwanî dijîn. Dîsa li dora Mûsil jî Kîkan dijîn digot. Berî Seiçûqiyan, di nava Kurden Dîcle de Xalaç bi Goran ve tevhev dijîn.{,?1"10) Seferoglû dibêje: Kîkan 48 zend-boy in û Çurikan/Çurukan jî bi 24 zendan girêdayî wan in. (tJ1'61) Iro, Zaza û Çareklî yen Dêrsîmê ku li Bîngol, Dêrsîm, Sîwerek dijîn, ji wan Gûrlu-Goranan hatine. (12S"2S, Di wê herêmê de hîna jî êlên Canbegan hene. Kîkî li Mêrdîn, Amed û Rihayê dijîn û 24 berên xwe hene. Milekî wan ya bi navê "Kîkî Xalaçan" jî heye. (9M0) Tê xuyakirin ku ew koma wê deine wek federasyon li navenda Xorasanê di bin wî navî de dijî, Waliyê Ezinganê Kemalî jî îdeka dm ê cüda dike ku mirov nikare di ser re derbas bibe, ew jî dibêje: Canbeg girêdayî Şadiyan e. Ez jî di wê baweriyê de me, Jewra Şadî dewleteka ji konfederasyona êla pêk hatî bû. Ew Kurdên ku îro Kurdiya xwe şikestî, bi piranî di navê de bûn. Seferoglû

dibêje: piştî ew hatin Anadolê navê wan di bin sîwana Badiliyan de xuya dike. Canbeg, girêdayî Bexdiliye, ku yek ji 24 zendên Oxûzan e. Di deftera Osmaniyan ya Tahrîr de wek "Konar-goçer Tirkmen Ekradi Taîfesî" derbas dibe. Ji keviyên Dîcle hatin Qonyayê, navê xwe dan navça Cihanbeyli. Beşek li Akşehîre û beşek jî li Haymnnô bi cîh bûn.<91’62) Ti ku û kîngê bi vî navî bûn û kîngê bûn Canbeg nanivîse. Bi texmîna min, ew, dema hatin rojavayê Kurdistanê ketin bin sîwana Badiliyan. Bi qasî tê zanîn dema Badilî li destpêkê hatin Anadolê 125 êl girêdayî wan bûn.

Li Sincik-Semsûrê girêdayî Qereçoriyan êlêka bi navê Canbeg heye. Kalê me yê pêncan Yûsûfê Qereçorî rojekê tere gundekî Poturgê nava Canbegan. Piştî bûyera kûçik kişandî ode, Canbeg keçikikê didine Yûsûf. Navê wê zendî wek "Heft Zend-boy" derbas dibe. Di dema Osmaniyan de li Kutahya-Sarisû û Qereçamê bi cîh kirin. Canbeg ji Bexdîliyên Oxûzan e. Bexdilî, yek ji pêne êla ku hükümdar derxistiye ye. Li bakûrê Sûriyê, mile Tirkmenên Bozok pêk

tinin. Di nava Tirkmenên Helebê de jî hene û di avabûna dewleta Safewî de

cîh girtin. (l21~144)

Gundê Kadioglû-Akşehîre di sala 1891 an de ji ali 8 malbatan ve hate avakirin, Ew Kurd in. Gor kalên wan gotî; ew ji Turkîstanê batine. Demekê li Iranê jiyane.]i bo ku mange/ga xwedî dikirine Iraniyan ji wan re gotiye "Gawestiya". F.l û zendên Kurd bi vî awayî navên xwe hatin guhartin. (89l7) Gelek kes dibêjinku Canbeg saxekî Kîkan e. Kîkî li Kiziltepê û li gelek gundên girêdayê wir dijîn ku hejmara wan 21. 883 kes tên nîşandin. Kurmanc û şafû ne. Bi xismên xwe yen li Suriye re di têkîliyê de ne û rêxistinên Kurd re alîkar in (108-238) Canbegên li navenda Anadolê henefî ne. Kîkan ne êlêke, herî kêm ji du êlan pêk tê. Di navbera Milan û Kîkan de hertim hevkarî hebûye û ji berê ve cîranê hevbûne, havînan

zozanên xwe cûda bûn.Ml:î ,3i Kesên mange xwedî dikirin bi Kîkivan re diketin tevgerê û zivistan li deşten Bismil, Çinar û Amedê derbas dikirin. (ll3'l39) Bi wî rengî gelek nûser û jeder yekbûna Kîkiyan û Canbegan didin xuyakirin.

Canbeg di nav tevgera Eba M. Xorasanî de jî tên dîtin. Piştî Eba ji alî Ebbasiyan ve hate kuştin, ew bi gelek êlên din ve hatin ser Ebbasiyan (748) û sê mehan bi wan re şere tola Eba kirin. Hêza wan şikest û ew vekişîn navbera Hama, Heleb û Meletiyê. Em dibinin ku beta sala 1164 an li wê herême dijîn. Piştre tên navenda Anadolê. Li Anadolê di bin kîjan navî de yan jî kîjan dewlet û mîrîtî avakirin? Ji fermaneke em dizanin ku ew li destpêkê di nava Qeremaniyan de b une:

Ji Begê Enqere û ji Qadiyên li wê herême re! Te ji min re name şandiye, ku Canbegê ji taîfa Qeremanlû ye di nav sînorên Aksaray û Enqere de dijîn, Bozcalû yê ji taîfa Haymana diziye dikine. Bazirgan, rêwîû gelên wir dişelînin û mirovan dikujin. Gelek êl in, ji ber ku li wir nîştecîh in merin ser. Lê dema va fermana gihîşte destên te, here ser wan û bixe dest. Yen ku van karana nekirine dest nedin wan. Sal 998/1585. (1M'54) Ji wê fermanê vekirî diyare ku ew giiêdayî Qeremaniyan in û hîna jî ew li cîhê xwe yê kevn in. Lê wê tespîtê Şerafnamâ şelpeze dike: Gelek zarok û kurên mîrên Kurdistanê diçûn tên Bediîse û wextê xwe vala li vir derbas dikirin. Zarokê êla Rojkî û kurên Begên Bediîse, ji bo xizmet an jî ji bo wexta xwe vala naçin ber deriyê mîrên din en Kurdistanê. Derwê§ Mehmûdê Qeieçêrî yê mezinê qebîla Qeleçêriyan ji welatê xwe çû dîwana Siltan Silêman. Mirovêkî bi gelek huneran bû. Siltan paşe ew kir serokê Sencexan (texmîna min: 1550-1566) û bi rêvebiriya kar û barên êla Cîhanbeg û jê re dayîna navçekji wîlayeta Paloyê ya bi riya mulkiyeta Iqtaî serfiraz kir.1157' 379) Di tercûma Soranî de wek êla "Beglû" derbas dibe, lê di tercûma Z. Avci de dibe Canbeg. Yan di vir de şaşitiyeke heye

yan jî êla Canbegan parçe bûye. Ihtîmala parçebûna ji bo zozanan jî heye, lewra di sala 1541 an de li zozanan tam 112.500 pezên Boz Ûlûs hebûn. Boz Ûlûs û yên mîna Dulqadirî, Qere Ûlûs bi wan re ginêdayî û êlên: Şam, Ekradi Îzzeddîn û yên din ên belav bûyî, xwedî 1.998.246 miyan bûn. Ji bo wê, Boz TJlûsê ku dihatin Çemîşgezek şaxekî biçûk

bû. (ll8~74) Ji wêbelgê jî xuya dike ku ew berê parçe bûne. Ew parçebûn mumkune tenê ji bo dema zozanan be jî.

Di dema Beyazîdê II an de, defterên tapoyê Esb-keşan (-Cihanbeyli) hatin avakirin û di wê deftere de jî wek herêma rêvebir navê Eskî-Il derbas dibe.*168"

,97) Cemeeteka girêdayî Hesb-keşan di dema Beyazîdê II an de Qerepinar ji xwe re war girtibû. Ji bo wê navê wê civatê wek Qerepinar derbas dibe. (168'

207) Ji wê hevokê jî xuya dike; ku di bingeh de navê êlê Canbeg e, lê carekê . kirine Atçeken-Hesp Keşan û hinek jî kirine Qerepinar...Hinek jî bi navê bavê wan hatine xwendin. Wek mînak: Taşgunlar û Ewladî Azîz yan jî Kosunlû (Kosunlû Yûsûf). (168-203> Di defterên Osmanî yên berî fermana jor de, ji bo êlên li sencexa Qonya navê "Atçeken" yan jî "Hesbkeşan" derbas dibe. Coğrafya wan bi piranî; di navbera Aksaray-Akşehîr û Enqere-Qonya de bû. (11l ll) Balkûşe ku îro jî ew li ser wê axê dijîn. Di sala 1530 an de bajaiên mîna Eskûl, >

Tûrgût (Yunak) û Baybûrt (Emîrdax) cîhê rêvebiriva wan êlana bû. Ji bo ku Hespkêşanan hespên bi dns xwedî dikirin va nava lênan. Ji ber wê di defteran de ew nava hate nivîsîn û ji hespên xwe jî bac didan dewletê, "at akçesî", lê baca çandiniyê jî nedihate stendin. Gelek salan berî Osmanî dawî li Qeremaniyan bînin, xuyadike ku lêxistineka zendî ya hespkeşanan hebûye. Di belgeyeka sedsala XVI an de tê fêhm kirin; ku gelê cotkar paşe

hatiye warê Canbegan. Baca wan jî Canbegan kom dikiriye. (111I1) Ji wê desthilatdarî û rêxistina bi hêz jî tê fêhm kirin, ku Canbeg lingekî dewleta Qeremanî yên bi hêz bûye. Di pirtûka "Cîhanbeylî" de tê îddea kirin, ku heiêm ji Bîzansiyan bi şûnde kete destê Tirkan û navê xwe yê yekemîn Esbî-Keşan e.ll43'23) Ew ne raste, lewra yekemîn kete destên Kurdan û navê kurdî wek H/esp-keşan lênan. Wata wê jî kesên hespan dikişinin e. Piştre dibêje: Kesên ji rojhilat hatine, li (In)-§ikeftên ku li girên niha navçe lê bi cîh bûyî de, bi cîh bûn. Ji bo ku şikeft wek mal bi kardianîn nav kirin Inewî. Cîhanbeylî ji Selçûqiyan bi şûnde kete nava sînorên Qeremaniyan, di sala 1466 an de bi Qonya re kete nava sînorên Osmaniyan.043’

23) Tê xuyakirin, ku piştî dikeve destên Tirkan navê bajêr jî diguhurin û dikin Inewî-mala şikeftî û piştî Qeremanî hatin belav kirin jî bi tevahî kete destên Osmaniyan û nav careka din hate guhartin. Gor heman defterê di sala 1530 an de li eyaleta Qereman 26 qeza, 6 qesabe, 2129 gund û 1831 mezra hebûn.

Ji bilî wana 1887 êlên Tirkmenên koçber hebûn. (11111) Xanên/malên Hespkê§an (Canbeg-li) li lîva-î Qonya 7.087 in. (11M6) Heman hejmar bi wîlayeta Qereman jî derbas dibe. (1,K36) Di dema Beyazidê II an de 343, di dema Selîmê I an de 680 xanên bac didin hebûn.<131'237) Di dema Yawûz de ew 1080 mal bûn. (13,'l98>

Piştî belavbûna Qeremaniyan, min gotibû beşekî mezin jî çû Xorasanê û hîna jî li wir bi wî navî dijîn û li dora bajarê Aşxan6 beşekî hîna jî koçbere. Yên li Anadolê mabûn jî em di belgeyên Osmanî yên fermî de di nava "Boz Ûlûs" de dibînin. Me gotibû ku Seferoglû dibêje: Kîkî yên bi navê Ûlûs ji 48 êlan pêk tên. Dibin du beş, yek ji wan beşana Curîkan e û ji 24 êlan pêk tê. Wek êlên xwe yên li Turkistanê bi tirkî diaxivin. (9l 61) Ez ne di wê zanînê de me ku

ew bi tirkî diaxifin, lê her nûserên Tirk wê yekê dinivîsîn. Dr. Gunduz radigi- hîne ku hinek êlên Dulqadir piştre tevlî Boz Ulûs bûn. (ll5 in) Dema mirov wêna belavbûna êlên li Anadolê dibîne, ew yeka rast dibe, gelek ji wan nêzîkî hev û wek cîran dijîn. Ewên ku îro li navenda Anadolê mane dûmahiyên Boz Ulûs in.

Dr. T. Gunduz dibêje: Boz Ulûs, heta destpêka sedsala XVII an li Kurdistanê bû, ji ber wê hukumetê kêm mudaxelê wan kir û zêde belge derbarê wan de tunin. Lê dema hate Anadoliya Navîn û ji wir jî li Enqere, Aydin, Keskîn, Sêwas û Qeremanê belavbûn bi şûnde, hikumeta navendî di derheqê wan de gelek belge hîştine. (115'n) Me diyar kir, ku berî wê demê jî Canbeg li Anatoliya Navîn in. Ewên ku di dûre hatinî dibe ku beşa din ê Boz Ulûs bin. Ew zenda ji bo zozanan diçû Mûş, Çewlîk, Çemîşgezek, Erzirûm, Gürcistan û Iranê. Bi navê Etrak û Ekrad gelek êl di nava xwe de xwedî dikir. Xwedî gelek pez bû, di sala 1675 an de, tene di destê Canbegan de 204.621 mî û 9.138 jî hûştir hebûnd90"211 Berê jî me gotibû ku di nava Boz Ûlûs de gelek êl hene û mirov dikare bibêje ew konfederasyonê. Jêderên Osmanî Canbega jî dikin nava wrê konfederasyonê.

Di beşa Reşî û Şûxbizinan de jî min nivîsî bû, ku piştî sala 1691 an dewletê dest bi cîhkirina êlan ya bi darê zorê kir. Ew yeka piştî Reşiyan ji bo Canbegan jî xistin jiyanê. Di salên 1700 an de biryar hate wergirtin ku çar berên Canbegan werin îskan kirin. Ew: Barçigan, Hudîl, Zival û Dirjan bûn. (90_94) Gelê ji gundê Tirko digotin: êlên me Xurma, Baçika, Doxika ne. Baçika gereg ew Barçikanli yên Orhonlû nivîsîne be. Di sala 1700 an de jî ji Xarpût û Kîxiyê xwestin derbasî bakûr bibin, lê nekarîn. Bi ser vê de, li herêma dikeve hundirê Kizilirmakê ku nexweşiya ta lê digerî Canbeg bi cîh kirin.{39] Ihtîmaleke mezine ku yên li Qoçgirî-Sêwasê mabûn ev in. Yan jî ewên ku di sala 1702 an de ajotine Rakkayê ne.

Halaçoglû li ser Canbegên li Kurdistanê van agahiyan dide: Canbegan, zirar li gelê Xarpût, Amed, Kolik û Gergerê dixistin û ji ber giliyên gelê herêmê, di sala 1702 an de ferman hat derxistin ku wan bajon bajarê Rakkayê. Ji ber ku Rakka cîhê cezakirinê bû.<156"4f,) Cîhanbeg, Şâx Hesen, Dede Sûlû ji berê ve li Gergerê rûd iniştin, lê wêder terk kirin û berbi Pertek, Çemîşgezek Saxaman çûn; gundên wir vala kirin û bi xwe di cîhê wan de rûniştin. Ew bû sedema giliyan. Di sala 1705 an de ji waliyên Erzirûm, Sêwasê û begê Palû, Kîxî, Çemîşgezeke re ferman hatin şandin ku Canbeg bên şandım Rakka û yên din jî bên şandin cîhên wan ên kevn. (I56‘5ü) Di sala 1704 an de Canbegên li dora Mêrdîn, Riha û Semsûr; bi taybetî jî be§ên li Gergerê xwestin derbasî herêma êla Dêrsîmê ya bi navê Şûx Hesen bibin. Bi ser vê de şer derket û Qadiyê Çemîşgezek hükümet agahdar kir û ew jî di sala 1705 an de fermanek derxistin ku Canbeg herin Rakkayê. Ji ber ku li nava milê çemê F irat lîlav û nexweşî gelek bû. Şeş salan şûnve, Milan jî li Rakkayê bi cîh kirin, lê di sala 1724 an de dîsa vegeriyan. Evên din jî di şûna xwe de msn.*®1

Kesên bi Koçurzade Koyûnoglû Ibrâhîm, lawê wî Çolak Mehmed, Huseynê lawikê Mistafa, Çobanoglûyê Canbegî berê bi Hama re girêdayî, li Humus û keviya çemê Belîh ha tin bi cîh kirin (1711), lê hate ditin ku ew ji cîhên xwe çûne. Ew ji ber erişen Ereban û germe firar kiribûn. Di sala 1720 an de ferman derket ku ew dîsa werin cîhê xwe, lê nehatin. Paşe, hikumetê got; eğer neyên deşte Havran xêre, ma herin keviya çemê Belîh. Di kontrola dewletê ya di sala 1733 an de hate ditin, ku ew li der û doran belav bûne. Gor wê ji, hewldan ku dîsa bînin. (90 97)

Prof. Halaçoglû d ibêje: Ji wan êlên ku li Anadolê rêbirî dikin, gel dişêlînin û rêwiyan dikujin dihate xwestin, ku bên ajotin Rakkayê. Di serî de Canbegên ku wek Ulûs dihatin nasîn, Şûcaeddînlû û Gullu Çorlu hatin şandinî Rakka. Ji wana, Japova, Dirêjan, Yarçekan, Herdillî û Zirgan yên

girêdayî Canbegan, bi 1000 malên xwe ve birin Rakkayê û cîhêkî ji Rihayê sê seetan dur. Lê hinek malên wan li Meletî, Dîvrîxî û Arapgîrê man, ku ji bo wan jî di sala 1712 an de ferman derket. (156'n3>

Di 1721 an de ji Boz Ulûs, êlên mina Sarili, Derili, Abdurrahmanli, Qeresirili yên girêdayî Oxûlbeyliyê li Kadinhaniyê bicîh kirin (Gereg ew Şadî bin, li wir niha Şadî dijîn-ş). Dîsa, komên Boz Ulûs ên mîna Ş6x Ahmet, Huseyn Hecî, Sakili li Haymana herêma Tunca (Toyçayir); bi Kuşna li Qereman di 1731 an de bi fermanê şandin. Atlandi-Qeremanê di 1752 an de, êlên mîna Küşne, Qere Xelîlî, Danîşmend û Çayanên girêdayî Boz Ulûs bi qasî 200 xane hatin bicîh kirin.*90”11 Di sala 1753 an de, li sencaxa Qonyayê û Navça Tûrgût û herêma Espkêşan û gundê Atlanti; ku li ser riya Hama, Şam û Misirê cîh digire; xwestin derbendekî ava bikin. Ji Tirkmenên Boz Ulûs: Izzeddîn, Küşne, Hamza Hecî, Emrud, Danişmend, Qere Xelîl û Çayan bi cîh kirin.*156 lü4)

Qeymeqamê Çanqiri ji bo ku bajarê xwe biparêze bi dil û can kar dikir; lê di wê demê de êla Canbeg û Tirkmenên Mûsaca, ji cîhên dijîn derketin hatin. Li Çanqiri, di herêma bi navê Kirpîlî diğerin, rêwî tazî dikirin û zirar didan gel. Bi ser wê yekê ve ferman derket û di wir de dihate xwestin, ku Canbegên hîna li ser qeyda Rakkayê xuyadikin, niha li sencaxa Meletî digeriyan. Ji bo ku zirar û ziyana gelê wir jî ji wan bê stendin pêwîste ew bên girtin û bên şandinî Rakka, sal 1740. Cemeetê Mûsaca jî bi qasî 3000 quriş malê xwe hebûn û li Barcinli ya girêdayî Afyon Qerehîsar (Qerehîsar-i Sahîb) pêwîste bi cîh bibin, sal 1752. (16°-R,I> Mûsacalû ji kîjan êlê ne em hîna jî nizanin, lê dibe ku êlêka Boz Ûlûs be.

Cengîz Orhonlû dibêje; di destpêka sedsala XVI an de Dulqadirî di nava Canbegan de heta Enqere hatibûn. Hinek komên din ên ji wan jî heta Şamû çûbûn. Canbeg di sedsala XVI an de li Amedê dijîn. Zivistanan ji başûri? Mêrdînê bigre heta Deyr-î Zorê li çolê derbas dikirin. Havînan jî

heta Erzirûmê diçûn. Di sedsala XVII an de hatin Anadol û Qeremanê. Paşê, li Qereman, Enqere (Keskîn), Kütahya, Aydinê bi cîh bûn. (9CM7) Li sala 1659 êlên girêdayî Kurt Mihmadli beşek ji şûna xwe veqetîn hatin Kuşadasi û mal çêkirin. Di sala

1713 an de ji wana çar xane li Der bend a Qaracaliya girêdavî navça Ilica, çar xane li Izmir û 36 xane jî li Kuşadasi bûn. (90'71) Canbeg û Boz Ulûs pişti vê demê li rojavayê Anadolê bi tevahî belav bûn. Ewên ku li wir mabûn bi tevahî heli- yan, lê beşek jî vegerî. Wek mînak, Zerikiyên di nava Boz Ulûs de heta Bûrsayê çûn, piştre hinek jê vegerîn dora Enqere.

Li ser êlên Canbegan zelaliyeka berbiçav nine, lê hinek jeder diyar dikin ku ew heft êl in. C. Turkay dibêje: Canbegan navê xwe yê din Heft Boy/Zendan in û ji van êlan pêk ten: Herdi (Herdîlî), ümeran, Omeruşaklari, Umranli-Umran, Zeyvelî ne. Yen din jî Barîckan, Diran-Deranlû, Dirzan, Herdi ne. (160) Gereg ümeran bi Omerûşaklari ve yek be; yekê jî, ümera û Umranli girêdayî Reşiyan e û navê wan ê kürdi jî Omerî ye. Boz-Ulûs/Tabanli li Eyeleta Qereman, Eskil, Akçeşehîr, Enqere, Ay din, Emîrdax (Qerehîsari Sahip Sencaxi) dijîn. Canbeg bi navêkî din Heft Zendan girêdayî êla Bexdilî ne. Li Sarisû û Qereçam a girêdayî Kütahya h atine bi cîh kirin. Wekî din jî li Haymana, Koçgirî, Kirşehîr, Çêrmûk... (160'276) Canbeg li Meletî, Erxaniyê dijîn. (l60'24) Ela Zeyveliyê ji Canbegan e û li: Enqere, Xarpût, Amed, Çorûm, Bûdakozu-Sêwas, Mecîdozu-Amasya, Rakka, Çerkeş-Çanqiri, Sinop, Meletî, Qers-Çildir, Sêwas, Erzirûm, Qerehisarî Şarkî, Amasya, Tokat, Çêrmûk, Mût- Içelê dijîn. (l6<Mfl9) Barîçkaniyên girêdayî Canbegan li Xarpûtê rûdiniştin û ji bo ku li Rakkayê bi cîh bibin ferman hafiye dayîn. Ew li: Xarpût, Keban, Rakka, Erzirûm, Qers, Çildir, Yozgat, Meletî, Ahiska-Çildir, Arabgîr, Sêwas, Mereş, Amed, Golê rûdinên. (,60'226) Beşekî ji wê êlê niha li Gundê Tirko

yê girêdayî Haymanê rûdinê. Ji gundê Palancî, Hesenê Mihkê (80 salî-1997) digot em ji Meletî hatin. ^ \g

Canbeg-Palancî, Hesenê Mihkê

Li Meletî êlêka bi navê "Baliyan" dijî; beri ew bêne Meletiyê li Dêrsîm û Madenêdijiyan. Baliyan ji milêSeydanliyên Dêrsîmêû ji Balaban û Şavalanliyen girêdayî êla Dêrsîmê veqetiyane. Gora deftera Meletî ya Tahrîr di sala 1560 an de di cîhe Baliyan de ev gund hebûne: Zeydanlû (2 xane), Kirlangiç (22 xane), Mamazar (26 xane), Kilîse (4 xane), Gözene (44 xane), Catena (44 xane). Ji wana Çatana û Gözene ne Baliyan in. Beşa din ên di dema Yawûz de reviyabûn jî, çûn çivayên Sêwas, Mereş, Akçadax û Dêrsîmê. Be§êk jî derbasî aliyê Yûnak û Cihanbeylî ya girêdayî Qonyayê, beşek jî derbasî Haymanê bûn. Be§êk jî der¬basî Sûriyê, Mereş, Ezingan, Pulumur, Tercan û Semsûrê bûn. Evên ku çûbûn Qonyayê beşek jê vegeriya û li Eskikoya girêdayî Doxanşehre bi cîh bû. Cevdet Turkay dibêje ew ji Kurdên Iranê ne û girêdayî Bozkoyûnan e û li Qonyayê koçer in. Baliyanên li Meletiyê mane Elewî ne, lê ewên çûne Cîhanbeylî, Yûnak û Haymanê bûne sunnî. (183 57> Bi qasî ez dizanim li Yûnak û Haymanê ti êlên bi navî Baliyan tunin û li wan herêmêna jî êla Canbeg rûdinê. Dibe ku beşa ji nav Baliyan hatî jî Canbeg bûn.

K. Yeşîlgoz, êlên girêdayî Canbegan û cîhê wan wiha dide nîşan:

Êl: Cîhê ku berê lê dijî:

Derg/Zîn, Deran Mûsil,Amed, Mêrdîn

Dirêjan ?

Xerdî Meletî, Xarpût

Modan (Melle Huseyn, Yûsûf) Amed, Erzirùm

Perîçkan Mêrdîn, Riha

Mereş, Çorûm û Yozgat

Yeşîlgoz pêne êlan girêdide. Ji wana Modanli, wekî berê jî me gotibû, yen yekemin li navenda Anadolê bi cîh bûne. Lê îro di cîhê wan de bi heman navî gundên Tirkên ji komê biçûk hene. Bi dîtina min ew di dema dewleta Qeremanî de bi cîh bûn û piştre dîsa vegerîn Kurdistanê.

M. E. Zekî beşekî ji Canbegan di nava Milan de destnîşan dike û Canbegên li Enqere û Qonyayê jî wekî 5000 malbat diyar dike. Di nava Milan de dû êlên bi navên Canbeg û Cîhanbeylî hene. Bi dîtina min sedema vê yekê ev e: Cîhanbeylî ji Anatoliya Navîn vegerîn û ji bo wê ew nava li ser ma, yen bi navê Canbeg jî nîştecîhu? Kurdistanê bûn û ew cûdahî ji wir tê. Di bingeh de herdû jî yek in. Gorî deftera Osmanî ya Tahrir, êlêka bi Kirmanckî axêf, êrîşkar û gelek zirar dayê derûdor, berê li Amed û Xarpûtê koçere û li Çanqiri, Çorûm, Kütahya, Enqere û Kirşehîıû bi cîh kirine. Dîsa we jî bi Milan ve girêdidin. Gor Kazim Yeşîlgoz jî ew berê li Agirî, Arapgîr, Gole, Qersê dijiyane û ji ber êrîşkariya wan ew rakirine Qonya, Kirşehîr û Sêwasê. (39) Der-Zin/Deranli û Dirêjan jî Canbegî ne û berê li Mêrdîn, Mûsil û Amedê dijiyan, rakirin Sêwasê.

Xerdî jî ji Canbegan bûn û li Xarpût û Meletiyê bi cîh kirin, lê li wir jî nesekinîn û rakirin Qeyseriyê. (39) Bakûrê rojavayê Enqere rûdinên, 5.000 malbat in, beşek li Akşehir, beşek jî li Haymanayê ne. (19'l89>

Gerokê Danmerkî Cersten Nîebûhr, di sala 1766 an de li Anatoliyayê geriyaye û li ser Canbegan wiha dinivîsîne: Ji 1766 an vir ve, ji Amed, Mêrdîn û heta Başûre Mûsil 10 hezar konên Canbegan hebûn. Canbeg li Agirî, Arapgîr, Gole, Qersê jî xuya dikine; nayê zanîn ku ewên hatinî şandinî Rakkayê ne, an beşekî din in. Li wê herêmê jî xerê bi der û dora

nekirine û li Qonya, Kirşehîr û Sêwasê bi cîh kirine. Ew yeka ji alî gelê herêmê ve jî tê pejirandin. Ji gundê Tirko-Haymana Huseyn Candan û Mûstafa Yildiz (65 salî-1997) digotin em ji Qersê hatine. Cor wana digotin ew 300 salan berî vê hatibûn. Dîsa gora Deftera Osmaniyan a Tahrîr (1850?) ewji Amed û Xarpûtê rakirineû li Çanqiri, Çorûm, Kütahya, Enqere, Qonya û Kirşehîre bi cîh kirine.

Jı gunde Tirko jineka Canbegi

Gor rapora dewleta Tirkan kûr a bi mora "pir pir bi dizî" hazirbûyî (1970), Canbegan nifûsa xwe li Gerger, navça navendî û günden mîna: Beşgoze, Korûlû, Kiliç, Guzelsû û Gumuşkaşike 500 kes in; henefî ne û kurmac in. Ji bilî vê, dibêje: tevlî serhildanan nebûne û girêdayî welatê me ne. (I08'15) Dîsa gor heman raporê beşek jî li günden bi navê: Arica, Şenkoy, Kabaolûk, Çatalolûk, Aktaşe girêdayî Kixiyê 900 kes hene. (108'68) Li navça Çatê 319 kes xuya dikin, lê ziman tirkî hatiye nivîsîn. (10s'l24) Canbegên li Kangal jî 3215 kes in û Elevvî ne nos-279) y Bozovayê 317 kes in. (108'314)

Gor lêkolînên me bixwe kirî li Semsûrê sînorên Canbegan li rojava: ji belda Akincilarê destpê dike; li bakûr: beşekî ji navça Gergerê digire û berbi rojhilat dirêj dibe; li başûr jî: gundê Geldîbûldû dikeve nav û li rojhilat jî: heta sînorê Rihayê dirêj dibe. Nifûsa xwe texmînî 20 hezar kes in. Günden xwe yên têne zanîn ev in:

Kurdî Tirkî Şerhe jmar

— Kefeyrî —

— Akgun —

Tomak Îkîzce 1.300

Hinç Adali 250

—	Akçaveran	500
Kûtîş	Bostanli	1.500
—	Yaprakli	1.200
Tezenût	Ekînd	500
Kêlîlan	Kapili	1.000
Arga	Bozpinar	700
Gerbû	Samanli	200
Hud	Balli	600
Çepek	Eceler	600
Hunî	Dûmlû	1.000
Pîr hak	Kavak li	700
Encûz	Eskîtaş	2.000 *
Uçek		200
—	Dîkmetaş	150
Kûdan	Teknecîk	100

* Girêdayî Gergerê ye û günde Canbegan ya navendî ye.

Li gora rûspiyên Canbegan li Kolikê ev e : "Texmînî di dema Osmani- yan de êdî firehbûna xıoe sekirıî, yan jî dema kıı ev êdî parçe bûn ji Haymanê- Enqere hafine " hinek ji wan jî dibêjin: " Em heft bira bûn û ji Cîhanbeylî- Qonya hafin vira.. Rûspiyên Reşî û Mirdêsa jî dibêjine; ew berî sedan salan li wir bûne; lê li Canbegan dîtîneka bi wî rengî nîne. Xuyaye kıı ew dûre haline li dora Reşî û Mirdêsiyan bi cîh bûne.

Canbegên li Anatoliya Navîn; Ji Yûiiak-Cîhanbeylî bigire heta Pol- atli- Haymanê belav dijîn. Gundên girêdayî Yûnakê yen Kurd ev in: Yunak, Beşişikli, Çayirbaşi, Kamaran (Hecîfakiii), Hecîomeran, Gundê Xofê

(Hatirli), Bodan (Imamogiû), Qereyayla, Killar, Civikan (Koçyazi), Kurdan (Kurtûşaxi), Meşelik, Halisînan (Odabaşi), Ortakışla, Ozyayla, Golan Ga (Saray), Suşe, Sûlûklû, Y. Yeşîlyayla, A. Pîrbeylî. (178 27) Gundên girêdayî Polatli ye jî: Tecîra, Uzunbeg, Hecosmana, Tüfekçi, Micixa, Milsefa û Qirpoli ye. Girêdayî Cîhan- beyliyê jî Kelhesan, Turana ne. Girêdayî Çeltîkê jî: Rengan, Sorikan, Sagan, B. û K. Tfasan in. Girêdayî Kadinhaniye jî Sarikaya ye heye.

Günde Kelhesen

Li gundê Tirko yê Canbegî xelk dibêje ji me re Qere Mehmet Oxûllari tê gotin. Mûstafa Yildiz (65) di sala 1997 an de digot malbata me ev in: Xur-ma-Xurba, Doyika û Parçikan e. Canbegên li Anatoliyê xwe bi Gawestiyan ve girêdidin. Li Mereş û navçên wê jî Canbeg hene û vê re "Tafkirar" tê gotin. Bi tirkî jî "Tapkiran" tê gotin; li Xorasanê jî ew hene. Li gundên Kangal-Sêwasê yên mîna Dawidoglû, Pinarozu, Kuleklî, Qereahmetlî, Kabakçevlixi, Killik, Qeregol, Gebelîkatran, Ixdelî, Minarekaya, Kirlangiç, Sultanpinari, Kapikaya, Kurkçu û Diboglûyê Canbegî dijîn. Serhejmara wan 3215 kes in, zarava wan kurmancî ye û ew elewî ne. (164'175)

Di nava koma Canbegên ku îro li bakûrê Kurdistanêbi cîh bûne de zêde koçberî nayê dîtin. Gorî em ji rûspiyan hîn bûne, di derdora salên 1910-20 an de ji bo ku gundên mîna: Si ver, Givdiş û Rûzirî baca xwe nedan, ew ji alî Qer Osman Paşa (axa) ve hatine şewitandin. Lê dîsa jî ew dest ji gundên xwe ber- nedane û koç nekirine. Gundên xwe ji nû ve a va kirine. Hêza Qer Osman nagê wan gundana û gundê Gerbû (Gerbas) dişewitîne û gundî diçin Wêran§ehrê. Dema bendava Atatirk di salên 1988-1990 an de hate çêkirin 10-15 gund di bin avê de man û gel koçî der û doran kir.

Dema G. Perot di sala 1861 an de diçe gundê Tirko (Canbeg) û Tabu- roglû çavdêriyên xwe wiha dinivîsîne: Serê jinan wek gulokek mezin hatiye girêdan, mîna beroşeke nuxumandî. Xavikî spî bi ser wê qelafetê kofiyê ve girêdayî bi ser milan dadikeve. Kincên mêran dibiriqin û ji qutikên sor ê bi ta yên zêr neqi şandı hez dikin. Dênikên (tas) serên wan kovikî ne. Dema ku

MIKAÎLÎ

(Şıpkan)

Navê vê êlê wekî di navê wê de diyare, ji navê kesekî tê, ku ew jî îhtîmaleka pir mezine serokek yan jî kesekî ku girîngiya wî di nava êlê de bû.

Li ser dîroka vê êlê agahiyên kevn nînin; ew jî îşareta wê yekê ye, ku ew berê di bin navekî din de jiyane. Tespîtên herî kevne ku em dizanin ji dema Tîmûr in. Di sala 1386-1387 an de Tîmûr erîşî ser Spîkan, Zêtikan, Sewêdiyan û Bazokayan kir û hemû ji ber revîn. Bi ser vê de, ew bi Beraniyan ve ketin nav hevkariyê. Pişti wê, tespîta din jî ji ali Torî ve tê kirin: Mehmed Begê Rewandûzî, teslîmî Osmaniyan bû şûnde, èlên mîna Bekrean û Reşkotan bi qehremaniyeka qet nayê dîtin li ber xwe dan. Hafiz Paşaye Osmanî, bê îstîsna guh, poz û tiliyên jin, zarok û kalên li berxwe dabûn jêkirin. Xelk li hember vê hovîtiyê koç kir û teslîm bû. Li hember berxwedana êla Sîpkî ya li Ezinganê jî Osmanî derbasî şer bûn; Sîpkî têk çûn û belav bûn.t3H> Ji bo me xala girîng ew e, ku ew wê demê li Ezinganê bûne.

Di beşa Reşiyan de jî min dabû xuyakirin ku gelek nûser Mikaîlan di nava Reşiyan de didin xuyakirin. Ew dîtin bi min zêde balkeş nayê; ji ber ku ew

îddea li ser hinek agahiyên kêm hatiye hûnandin. Mikaîliyên li navenda Anadolê bi Reşiyûn wir vê ji hev cûda ne, çavdêrekî baş dikare ferqa wan ên: fizîkî û devokî bibîne. Dîsa jî rastiyeke ku êlêka bi wî navî, yan jî ew, di sedsala XVI an de li dora Semsûrê tên dîtin. Gor dîtina birêz Dr Mikaîlî, ew êla han, berekî ji Adaman e. Adaman ji van berena pêk tên: Kaskan-Nezoî, Kaskan- Reşoyî, Kaskan-Seboyî, Şemsikan, Delikî, Plakan, Kaskan-Çetoyî, Çomoyî, Kaskan-Amuçeto ne. Serhejmara tevahî Adamanan nêzîkî 20 hezar e. Li Anadola Navîn tenê ji wan Mikaîla hene. (M>"62) Di nav êlên Adamanan de wekî xuya dike Mikaîlî tunin. Dîsa heman nivîskar dibêje: Li başûre Kurdistanê jî tê gotin ku beşek ji Caf an Mikaîlî ne. (18, 38) Caf ne komeka kurmancî axêf in, bi vî navî êlêk di nav Cafan de heye û dibe ku nav wek hev bin, an jî dema Caf hatin (1774) Serhedê beşek ji Sîpkiyan ketibe bin sîwana wan. Berovajî wê di nav Sîpkiyên bi nav û deng de Mikaîla hene. Ji alî fizîkî û civakî ve jî ew dişibînin hevûdû.

Wekî tê zanîn piraniya Sîpkiyan di Sovyeta kevn de û li bakûrê Kurdistanê dijîn; yen çûbûn Rûsya ji bakûr çûne. Endamê Kongra Netewiya Kurdistanê hevalê birêz Ezîzê Cewo jî ji wê federasyonê ye, belavbûn û şaxen wê vviha hejmartin:

1. Mikaîla: Li Pampana Kurdan (Sıpan) û Elegezê dijîn. Ezîzê Cewo ji wê êlê ye û ew Êzîdî ne.
2. Kilera: Li Talînê gundê Qibixtepê dijîn.
3. Çiliyan: Li deşta Araratê dijîn.
4. Şemsikan: Li Pampa Kurdan û Elegazê dijîn.
5. Isêdizan: Li nehiya Talîn gundê Heko dijîn.

6. Ûtî (Witî).

7. Stûrkiya.

8. Kerreya ne.

Heta vir ew pirsa derdikeve holê, gelo têkiliya Adaman û Sîpkiyan çi yê? Em î§aretên wê pirsê di rapora dewleta Tirk de dibînin: Gor rapora dewla-ta Tirk a kûr ku amade kirî (1970) û bi mora "pir pir weşartî" hatî bi dest xistin, êla Heyderî li Kurdistanê xwedî 56.790 nifûs e; kurmanc û şafû ne. Ew li Pat¬nos, Diyadîn, Taşliçay, Hamûr, Bazîd û gundên wan dijîn. Şaxên xwe ev in:

- Adaman, Adaman (milê Badoyî)

- Adaman (milê Çomoyî. Dibêje navbera wan û Plakanliyan baş e.)

- Adaman Kaskan, Adaman (milê Mikaîl): 2510 kes in, li Hamûrê dijîn û bi Bilikaniyan ve nakokiyên xwe hene.

- Adaman (milê Mikaîl): 630 kes in, li Taşliçay dijîn.

- Adaman (milê Kaskan-Reşoyî): 1840 kes in, şafû ne û li Diyadînê dijîn.

- Adaman (milê Plakan): 3540 kes in, şafû ne û li Taşliçay û gundên wê dijîn, li Mûşû şaxê xwe hene û bi Tirkan re li hev nakin.

- Atmanekî (milên: Melle Dewsî, M. Kalender): 2630 kes in, şafû ne û li Hamûrê dijîn.

- Hevîdî: 1250 kes in, şafû û li Patnosê dijîn. (,08'45/55)

Ji wê wêneyê tê fêhm kirin, ku e w dem bi dem di bin sîwana federasyon û konfederasyonên mîna Adaman, Heyderî û Sîpkî yên cûda de jiyane. Li Erc^ê jî êla Heyderanî dijî ku hejmara xwe 21.100 kes in. Berên wê êlê wek: Sarmali, Xelikan, Şahkolû, Mikaîla û Dawidî hene. (lu8'346) Ji ber şer û komkujiyên li hember êlên Kurd, ew jî mecbûrê yekîtî û hevkariyê bûne;

ji bo wê gelek caran wêneyekî safî em nabînin û êlêkê tevlî ya din bûye ku ew yeka divê bi me ecêb neyê. Ji wan êlên navê xwe derbas dibin em dizanin Delikî, Celikî ne; dîsa Plakanê li Agirî û Xorasanê wek Pilekan derbas dibin û Kaska jî li Xorasanê hene. Hewêdî li Xorasan û Hindistanê hene. Reşî jî me qal kiribûn.

Avyarov ji arşîva Rûs radigihîne, ku êla Spîkî û Rediki (Reşikî?) ji ber baca giran di sala 1834 an de reviyane Erîvanê. Li Erîvanê navê cîhên mîna Zîlan, li Ahaska Sêx Hesenan, li Sürmeliye Redikan, li başûre Eledaxê Heyderanli, li Tûtak û Hamûrê Spîkan bi navê êlan ve tevhev dihate xwendin. (28) Di navên li

jor me nivîsîne de, tenê Adaman nine, dibe ku ew jî ji wan naven li jor yek be û hemû li herêmekê ne. Ew jî piştrast dike ku ew wek konfederasyon bi hev re tevdigeriyane. Di sala 1855 an de êla Spîkan bi beşen xwe gîştikan ve Beyazıt terk kir çû navbera Patnos û Tûtakê, ango li çiyayê Qertwinê bi cîh bû. Bere li wir Kürden hzdî hebûn, lê di sala 1790 an de Siltan Ahmet ew di komkujiyê re derbas kiribûn. Spîkiyên bi "Êzdiyên Misilman" tene navkirin weder ji xwe re kirin war. Di sala 1774 an de ew ji Isheq Paşaye Kurd veqetîn û çûn Erîvanê. Paşe bi teşwîqa Osmaniyan vegeriyan. Di heman salê de beşekî Cafan jî hatin. Caf, êlêka (konfederasyoneka-Ş.Reşî) ji 10 hezar xaneyan bû, zivistanan li Silêmaniyê, havînan jî li Iranê dijîn.t28) Cafên ku Dr Mikaîlî qal dike ev in. Ji bo wê, di sala 2006 an de ez çûm Brukselê û bi Wezîrê Eşo re min hevdîtinek kir.

Wî li ser koma xwe Sîpkan wiha got: Piştî salên 1800 an, serokê Sîpkan, Sari Silêman Axayê Sîpkî ye. Ji ber beşekî ji Sîpkiyan misiimantî qebûl kirin, beşe ku wek Ezîdî mabûn hertim biçûk dihatin dîtin û ji aliye misilmanan ve bi qerfan re rû bi rû diman. Bi ser wê ve, di navbera salên 1820 û 30 an de, êla Sîpkan jihev veqetiya. Yen baweriya xwe Ezîdî bûn hatin

Eleşgirte û heta salên 1878 an li wir man. Dema xebera veqetandina êlê gihîşt Silêman Axa, ew pir xemgîn bû, mirovên xwe li dû wan şandin, lê ew venegerîn û tê gotin ku axa pir bi ber vê yekê ketiye û li jinûyên xwe xistiye... Ihtîmaleka mezine ku ew ji dora Entebê hatine Eleçgirtê. Dema li Eleşgirte bûn, şere Osmanî û Rûsan destpê kir. Rûsan Qêrs wergirt bi şûnde, biryar dan ku derbasî alî Rûsan bibin. Bi wan re hevdîtin kirin, ji bo ku Roma Reş (Tirk) pê nehese bi şev karwanên xwe derxistin rê û bi berbangê ve gihîştin (1880) Qersê û nav sînorên Rûs. Di sala 1918 an de çûn Ermanîstan û Tiflîsê, Ew gotin parçeyekî dîroka Sîpkiyan e, lê xuyaye ku ewên bûne misilman li dhê xwe mane. Wê demê pirsgiiêkek derdikeve hole, yen li Haymanê kîngê hatin?

Gundiyên Mikaîla

Gundiyên Mikaîla dibêjin em ji Riha-Wêran§ehrê hatine, lê di jêderên Osmaniyan de ew ji Agirî û Bazîdê hatine.Dibe ku wekî Eşo dibêje ji dora Dîlok û Rihayê çûbin Bazîdê. Ji wir jî hatibin Polatliyê. Li gundê Mikaîla gorên heri kevn ji sala 1802 (1222) an de mane. Dîsa li ser kevirê gora Hec Ehmedî Mehê 1274 (1855) û li ser Oçoyê Mehê jî 1271 (1852) hatiye nivîsîn, Li ser kevirê camiya kevn jî 1258 (1837) tê xwendin. Gor gotina Izetî Osikê, gund di sala 1227 (1806) an de hatiye avakirin. (18062) Di navbera gundiyên Mikaîla bi Ê§o ve cûdabûneke pir hindik heye; lê jêderên din jî gotina Eşo piştrast dikin. Di sala 1855 an de ji Bazîdê hatin û li gundê Mikaîla yê girêdayî Poiatliyê bi cîh bûn. Berên xwe jî ev in: Sîpkî, Kilirî, Biritî, Mankî û Muhailî ne. Navê xwe yê dawiyê Mikaîla ne. Yeşîlgoz jî dibêje Sîpkanli yan jî Memekanli li Melazgir û dora gola Wanê dijîn.{3,?) Vê hatine nivîskarên din jî piştrast dikin: wek Alakom heman dîrokê didin. (12-~70) Di sala 1850-56 an de rewşenbîre Kurd Mela Mehmûdê Beyazîdî

vviha dinivîsîne: "Ji hemûyan camêr û reşîd tayîfa Spîkan e û qedîmê axayê wan mala E'tl e û li axa Bazîdê dijîn; çend qebîlên wan hene:

Ji wan jêderan jî diyare, ku ew herî dawî li dora Bazîdê dijîn û ji wir jî belav bûne. Wekî tê gotin beşekî tere Rusya yê, beşek tê Anadolê û mumkune beşek jî çûbe başûre Kurdistanê. Lê bawer dikim ew beşa bi Cafan re çûn.

Mikaîliyên li Rûsya me li jor gotibûn, yên li Enqere-Polatliyê li şeş gundan belav bûne. Gundên Mikaîla: Mikaîla (Înler)-Mikaîlî-Milan, lice (Ilica) Mikaîlî-Tirk. (,73'6) Mîkaîlî, li Enqere, Çanqiri, Adana, Uzeyr û Qerehîsarî Şarkî, Haymana, Ergûvan (Sencexa Xarpûtê) dijîn û wek taîfa Yorukan hatiye nişandan.*160'58® Gundên ji êla Rûta jî wekî Mikaîla dihesibîne lê divê ne wiha be, Rûta bi piranî di nava Şadiyan de xuya dikin. Gundên Rûta ev in: Rûta Newalê (Yenî Mehmetlî), Rûta Gazê, Koçika (Sapanca), Avda (Hecîmùsûl) ne.

Gundê Rûta

Ewên İİ îran û Wanê (Hamûr, Taşliçay) kurmanc û şafû ne. (180h2) Şâx Mewlana Xalidê Mi kaili, li Silêmanî-Qeredaxê rûdiniştiye ku Neqşîbendîtî wî di nav Kurdan de belav kiriye. (18138) Spîkan û Bazokaya (Melazgir, Tûtak, Dîlok, Xinis) jî 42-67 tîrên xwe hebûn. Pirtûkên dîrokê dibêjin ew herdu kom, rûmeta ola Islamê nedizanîn. Spîkan dereng misilman bûn Ci ji Êzdatiyê derke- tin. Bazokiyan jî, ji Şi a yen Batını bûn. Şûn û ware Spîkan deşta Bazîdê Spî bû û navê xwe jî ji wir wergirtin. (32) Spîkên li Rûsya hîna jî Êzdî ne. Yên li Anatoliya Navîn jî sunnî ne.

Di alî kincan û kevneşopiyan de ti cûdabûna Mikaîliyan bi komên din ên herêmê re nine û ji bo ku me berê qal kiribû hewcê nake ku em careke din dûbare bikin.

Gundiyekî Rûta

SEWÊDÎ

Li ser navê vê êlê rîwayêtên cüda hene, yek ji wana min berê jî nivisî bû, ku xwarziyê Eba Muslim, Babekê ji nesla Nebt/iye Sevadan kurê Abdullahê ji Medya ye. Diya xwe jî ji gundê Bilalabada (Kelanrûd) Mimeda li Ezerbeycanê dijî û jineka navê xwe Brûmid/Burûmend çaveke xwe kor bû ye. Navê bavê wî jî Merdes bû. Ne dûre ku navê êla Sewêda ji wî binemala Sevad hatibe; lewra em dizanin ku ew êl alîgirê Eba Muslim bûn û ji bo tola wî hilnin, ji navenda

Xorasanê hatin dora Kerkûkê. Navê Merdes jî li ser êlekê ye û dibe ku herdû êl ji kokekî veqetîbin. Alternatîfa din a li ser koka wî navî jî, ji alî Şerefxan Bediîsi ve hatiye nivîsîn.

Ji Gundê Sewêdî Cîmanê Derbas

Kok û serokaniya binemala Mîrên Sewêdî diçe digihîje Bermekiyan. Eslê êla wan digihîje yekî bi navê Eswed, ku di dema xwe de kolê eshabekî FÊxember e. Gor rîwayetekê jî: cihê êla Sewêdî yê eslî, li gundê Suwêdeyê du qonax ji Medînê dûr û ber bi aliyê Şame ve ye. Lê neslê kurê Bermek diçe digihîje melîkên Farisan. Tê gotin ku berê li wîlayeta Belhê jiyane û agirperest bûne.<157 276) Bi qasî em dizanin têkiliya Sevvêda di dema Ebbasiyande bi Ereban re hebûye. Berî wê ti agahiyên zêde nînin; lê piştî şere bi Ebbasiyan re, ew berbi bakûrê Kurdistanê hatine û herçiqas îhtîmaleke kêm be jî, dibe ku navê Sîwêrekê ji wê êlê tê. Agahiya Şerefname ji bo gundê Suwêde jî dibe ku rast be. Hîna ku nehatine bakûr dibe ku li wir bicîh bûbin û ew nava jî ji kalên xwe wergirtibûn dane ser gund. Gor lêkolînên min kirî jî, ew Zerdeştî bûne, lê ti têkiliya wan bi

Farisan re jî nine. M. E. Ewnî dibêje, rîwayeta nêzîkî rastiyê ev e: Ew êla ji Kela Sewêdî ya di navbera Amed û Rihayê ku niha jê re Sêwrek (Sîwerek) tê gotin hatine. Ev jî dema ku xaçperestan derûdora Şan^ girtin û qismek Cezîrê îstîla kirin, Rûm û Ermeniyan wira kirin destên xwe, ew jî koç

kirin, Rêywendiya wan bi gundên nêzîkî Medînê re tune ye. (157 4991 Ji bo ku ji navenda Xo rasa ne hatine, dibe ku Şerefxan li ser wî bingehî nivîsiye.

Navê din ê ku li wê êlê dikin jî: "Qilorî" ye. Ew nav ji dema Osmaniyan ve maye û îhtîmaleke ku bi vî awayî jî ketibe qeydên Osmaniyan. Heta roja îro ji alî gel ve 0 ji alî êlê ve jî carna bi kar tê ango gel jî wê yekê dizane. Li aliyê din navê Bermekî di nava gel de nayê nasîn. Gor rîwayetê, Osmaniyan bacê ji Sewêdiya xwestiye û ew jî fîlîkê bizinan dane û ji bo wê ji wan re bi tirkî gotina "Kil veren=fîlîk dan" û ew nav di pêvajoyê demê de wekî Qilorî tê guhartin. Lê navê herî rast Sewêdî ye.

Li ser dîroka Sewêdiya kevn agahiyên konkret nînin, tenê em dizanin ku ew jî ji navenda Xorasanê hatine. Li ser wê bingehê em texmîn dikin ku ew jî di bin sîwana Saka de bûn. Di dema Eba Muslîm de tê zanîn ku ew di nav tevgera wî de bûn. Şerefxan jî dipêjirine ku ew ji navenda Xorasanê hatine. Wê serdemê navenda Xorasan û Arran kêla berxwedana Kurdan bûne. Ş. Bedlîsî dibêje: Al-î Bermek ji Turkîstanê bi leşkeren li dijî Emewiyan re hatin Iraqê û ji bo damezrandina Ebbasî gelek têkosiyan. Çar kes ji wan bi nav û deng bûn:

1. Xalîdê Cehfer: Bi Ebu Muslîm re hat Iraqê û bû wezîrê Ebbasiyên Xwînrêj.

2. Yehya kurê Xalid: Ebû Cefherê Mensûr, Ezerbeycan da wî û Mehdî kir wezîr.

3. Fedlê kurê Yehya: Wezîrê Harun Reşîd bû.

4. Cehferê Kurê Yehya: wezîrê Harûn Reşîd bû. Di dema Cehfer de fermana qirkirina Bermekiyan derket. -C. Rojbiyanî. (157'499)

E. Cemîl Paşa dibêje: Harûnê Reşîd, mêrê mezin Caferê Bermekî da kuştin; Bermekî ku hem gewremerd û hem hevalê wî bû û bi salan ji bo pê§veçûna Ebbasiyan kar kiribû. Ew ked û dilovaniya Bermekî ji bîr kir û serê wî hat firandin. Ji malbata wî jî pir bêgunehên din hatin kuştin. (9l95) Lê sedama wê kuştİne nanivîse. Şerefxan dibêje: Cehfer di dema Ebdulmelikê kurê Merwan an jî gor rîwayeteka din, di dema Silêmanê Ebdulmelik de, bi serwetek gelek mezin, bi xizmetkarên zêde koçê Şamâ navenda fermanrewatiyê kir. Xelîfe ew bîhist û bangî wî kir ku were meclîse. Serokê êlê Cehfer diçe dîwana xelîfe û li hundur xelîfe wî dide girtin. Ji bo ku di qaşa gustîrka wî de jehr hebûye, Xelîfe wî dide girtin. Cehfer jî wê yekê rast dike û dibêje: dema ez di tengasiyê de mam ezê qasa gustîrkê bimijim û bimirim. Bi ser mêraniya wî ve xelîfe wî dike meclîsê û navê wan jî dibe Bermekî. (ls7277) Wata wê çi ye? em îro nizanin, lê gereg wateka wê bi erebî hebe.

Li ser nakokiya Sewêdî û Ebbasiyan tê gotin; ku Harûn Reşîd bi gotina fesadan kir û Cehfer kuşt, Yehya û Fedlê jî avêtin zîndanê û dest danî ser mal û milkên wan. Mûsa jî îhtîmaleka mezine ku reviya çiyayên Kurdistanê û xwe weşart. Li ser wê rêvê gelek çirokên cûda tên qal kirin. Ji bo ku ew kesên ji êla Sewêdî di rêvebiriya Ebbasiyan de cîh girtine û meqamên girîng ketine destên wan û têkiliya wan û Ebbasiyan li destpêkê baş bûne, îro hinek Sewêdî (yen Anadolê) dibêjin eslê me Seyid e, yan jî digihîje Hz. Muhammed.

Şahane Mala Başö-B. Mezin

Bingeha wan gotinana ew kes û têkilî ne. Yekê jî, di serdemekê de xwe nêzîkirina Ereban, misilmanan û Hz Muhammed jî kes yan jî kom dikirin xwedî îmtiyaz, yanê ji bo berjewendiya bi giştî bû. Di nava wê de bac nedayîn, heyî bi ser de dibarîn, li kîjan cîhî bixwazî bi cîh bûn, azadî, esker nedan û hwd. Lê ji alî biyolojîk û nijadî ve ti têkiliya Sewêda bi Ereb û Ebbasiyan re nîne. Ew di pêvajoya dîrokî de jî xuya ye: ku Ebbasiyan ji bo ku Emewiyan hilweşînin, ji Kurdan gelek îstîfade kirin, xwe nêzîkî wan kirin, meqam danê, lê piştî ku xwe rihet kirin û desthilatdariya xwe qewî kirin jî, wekî hêzên din vegerîn ser Kurdan, eriş kirin, ew kuştin û hêza wan lewaz kirin.

Tê gotin ku bingeha vê ya dîrokî wiha bûye: Bi alîkariya Eba Muslim û Kurdan desthilatdariya Emewî hilweşiya û Ebbasî bûn desthilatdar. Ebbasî, ji hêza Kurdan tirsiyan û di bin re destpêkirin ku wana ji holê rakin. Gelek serokên Sewêdiyan bi hencetan dan kuştin. Ew qesrên ku Sewêdiyan ji xwe re çêkiribûn Ebbasiyan qebûl nekirin û xwestin ku ew wana hilweşînin û ji bo Xelîfê çêbikin. Sewêdiyan va fikra qebûl nekirin. Ji ber vê Ebbasiyan fermana kuştina beg û serokên Sewêda (Bermekî-barmaki) dan. Di sala 790 an de kurê Xalîd Mûsa direve tê çiyayên Gêncê. Li wir Hemîdiyan û Şemsiyan jî ew pejirandine. Wî serokî cara yekem yekîtiya di nav Kurdên wan deran de pêk aniye. Di nav wan de Ermen û Gurcî jî hebûne. Di vir de mirov dikare texmîn bike, ku li dijî hovîtiya Xelîfe ya bi gelên cîran re hevgirtinek pêk anîbûn. Ji Hemîdiyan re Merwanî jî tê gotin ku piştre ew li Amedê bûbûn xwedî dewlet.

Wekî tê zanîn Hemîdî xalanê Xelîfê Emewî yê dawî Merwan in, Eba Muslim ew li Musilê têk bir (749) û ew reviya Filîstînê. (9158! Kurê wî ji wir hatibû Amedê. Şemsî jî êla Kürden Zerdeştî ne, ji bo bawerî bi agir û rojê dianın, Ereban navê Şemsî lênabûn. Di vê gavê de Hemîdî û Şemsivan li dijî Xaçperestan bi hevre îttîfaq di kirin. Piştî ceng Ci şeren gir an, wan

Kürdana li çiyayên Qerece û Xoxê, Heleb, Efrîn, Elezîz, Şemsat, Sîwerek, Xarpûtê bi cîh bûn. Şerefxan jî dibêje: Gor rîwayeta di nav gel de tê gotin: Di dema Ebbasiyan de, sê kurên (yek ji wana Mîr Şahab e) Al-î Bermek, Bexda terk kirine û ber bi Kurdistanê hatine. Li ciyekî navê wî Hançûk yê li Çiyayê Şeftalûye girêdayî Gêncê bi cîh bûne. Piştî Şahab kurê wî Emîr Celai tê ser rêvebiriyê. (157'278)

Di sala 839 an de Xeiîfe êrîşî Kurdên bi navê Hemîdiyan, Diyîloyan, Di-hîvan, Lawatidyan, Karyan, Barizan-Beranan-Mirdêsiyan, Siwêdiyan kir. Vê hevgirtina Kurdan şer winda kir û leşkeren Xeiîfe ji wan 500 hezar kuştin. Piştî ku xeiîfe bi wê zilmê bihîstiye, serleşkere xwe avêtiyê zîndanê. Lê vê polîtîkayê jî Kurd baş nasdikin ku berê di komkujî yê re derbas bike û piştre jî kesekî wek sûcdar bavêje zîndanê û destên xwe bi xwîna Kurdan bişo! Xala girîng ew e, ku li wê herêmê (Mûsil) Kurdên Sewêdî û Mirdêsî hebûne.

Gundê Sewêda B. Mezin

Di sala 852 an de Mîrza Muhemmed dibe serok, bi Kurdên Çemîşgezek ve hevgirtinek pêk tîne û erîşî Ereban dike. Kurdên Çemîşgezek me di beşa Xorasanê de dabûn xuyakirin. Di sala 892 an de di şer de şehîd dikeve. Di şûna wî de Emîr Mîrza Şah Fexreddîn dibe serok û di serî de xeiîfe û hemû cîran wî nasdikin. Li dijî Ermen û Gürcan jî şer kiriye û di dema wî de Xarpût, Xelat, Ercîş kefiye destê wan û bi giştî 82 êlên Kurdan di bin destê wî de bûne. Dİ sala 927 an de Mîr Muhemmed Berokî bû serok û di dema wî de Sîwerek ji dest Hemdaniyan hat stendin. Dibe ku navê Barmekî ji navê wî mîrî jî tê.

Di sala 1045 an de Melîk Muhammed dibe serok û ew bi Merwaniyan re hevgirtinek pêk tîne. Ji şere Bîzansan bi şunde yekîtiya wan li Warê

Berana (Muş), Bedlîs û Xelatê jî pêk hatiye. Di sala 1054 an de Selçûqiyan erîş anîn ser wan, lê Selçûqî ji ber wan heta çemê Çoruhê revîn. Di vî şerî de alikariya Mehmûdiyan û Merwaniyan hêja bû. Ev serok di şere Melazgirtê yê di 1071 an de hate kuştin û di şûna wî de Emîr Perwîz Muhemmed dibe serok. Dİ derdora

salên 1152 an de Emir Celal serok e û gelek şeren misilman û xaçperestan çêdibe û Kurdên wan deran jî beşdarî ew şerana dikin. Di derdora salên 1180¬90 an de li gel Eyyûbiyan li hevkariyê diğerin, le Artûkî dibin asteng. Di sala 1200 an de bi Eyyûbiyên Meya Farqînê re yekîtî pêk anîn û şerten yekîtiyê wiha bûn:

a-Xutbe li ser navê Selheddîn bê xwendin. b-Li ser peran navê Selheddîn were nivîsandin. c-Herkes di bin ala xwe de here cengê.

U ew peyman heta sala 1218 an dom kir.

Di sala 1272 an de Emir Hesen dibe serok û welatê bav û kalên xwe hemû zept dike. Le li vê demê Dulqadirî ji rojava erişe tînin ser wî û ew jî bi Çemîşgezekiyan re îttîfaqê datîne. Sedsal piştî wê demê, di 1386-1387 an de Tîmûr erişi ser Sipkan, Zêtikan, Sewêdiyan û Bazokayan kir û hemû ji ber revîn. Bi ser vê, ew bi Beraniyan ve çûn îttîfaqê.

Di sala 1409 an de koçerên bi navê Pezgewr ji aliye Ezerbeycanê §rîş tînin ser Emîr Fahreddîn, Şex Hesenê Çemîşgezek, Mîr Omerê Kemah û êlên din, bi wan re aştî çêkirin. Di sala 1445 an de bave Şah Ismaîl, Şex Cüneyt hate cem Hesenê Dirêj, serokê Sewêdiyan nêzîkatî nîşan dayê û têkilî pê re danî. Tewerê ji Şex xwestibû ku Hesen dev ji welate de û bavê wî berde. Hesenê Dirêj jî xuşka xwe dabû Şêx. Ev daxwaza wan Kürdana nayê qebûl kirin û bi ser vê de dev ji îttîfaqa Pezgewran berdidin. Kurdên bi navê Bazokyan erîş tinîn ser wan; ev jî ji Çemişgezekiyan alîkariyê dixwazin. Di destpêkê de, ew Kürdana li gel Şah Ismaîl cîh girtin û li bajarê

Tebrîz mercên hevkariyê îmze kirine, lê pasê bi çewtî îttîfaqa wan belav bû.

Emîr Celai kurê Emîr Şahab dibe serokê Sewêdiyan. Pişt re, Emîr Mihemmed, Emîr Fexreddîn; Emîr Hesen tên. Mîr Mihemmed çû ba Hesenê Dirêj (1478 mir), wî jî Hançûk û Çepaqçûr da destê Mîr. Lê dema Mîr vegeriya di navbera wî û birayê wî Emîr Fexreddîn de şer derket û Mihemmed hate kuştin. Fexreddîn dema mir zarokên xwe biçûk bûn û lawê Mihemmed Ebdal Beg li cîhê wî rûnişt. Di wê demê de eskerên Qizilbaş ûrîş anîn ser Xarçûkê û heft şev û lieft rojan şer derket û Ebdal bi ser ket. Du kurên xwe bi navê Subhan û Siltan Ehmed Beg hebûn. (l37'2ôQ)

Ji şere Çaldiranê (1514) bi şûnde, ew herêma jî kete destê Osmaniyan. Di destpêka desthilatdariya Osmaniyan de, Mirnîşîn di navbera du kurên Ebdal de parve bû. (100'302) Wê demê ew mîrîtî wek Suweydî derbas dibû û giredayî Amedê bû. Li ciyê Ebdal Beg lawê wî Subhan Beg rûnişt. Piştî mirina Xalîd Begê Pazûkî, Subhan Beg nehiya Kixê (Keyx) ji destê mirovên Xalid Beg girt. Piştî şere Çaldiranê jî, nehiya Çepaqçûiê (Bîngol) ji destê Aykûtoxî-lî û Axçeqelê jî ji destê Mansûr Begê Pazûkî yê li ser navê Şah Ismaîl birêve dibir, stend. Ji dervayê wan nehiyên Zak û Menş Kurd jî ji destê Qadîr Begê Qizilbaş stend.057" 281) Piraniya wan deveran li derûberên Amedê ne. Iro jî dema Sewêdî diaxifin mirov dizane ku devoka Amedê hîna jî taybetmendiya xwe wenda nekiriye û

hîna jî li Qulpê Sewêdî hene. Herdu birayan wîlayet di navbera xwe de parve kirin. Çepaqçûr û ci yen bi wê ve girêdayî para Subhan Beg û kelên wîlayetê yen din jî para Siltan Ehmet Beg re ket. Piştî çend salan, fîtne û fesadı kete navbera birayan, ji aliyê dîwana Siltan Silêman ve fermana kuştina Subhan Beg derketû ew kuştin, Kela Çepaqçûrê jî ji memûrekî Osmanî re hat dayın. Subhan kurekî navê xwe Mexsûd li pey xwe hişt.

Ehmet jî 50 salan fermanrewatiya xwe îdare kir û mir. Du kurên wî hebûn: Mûrad Beg û Mihemmed Beg. (157282)/(100'302) Di sala 1516 an de ew bi tevahî mîrîtiya xwe winda kirin û li cem pismamê xwe Kixî cîh girtin.

Mexsûd Beg piştî kuştina bavê xwe ket maiyeta Siltan Silêman. Bi eskerên Osmaniyan ve li Arpeçaya girêdayî Nehçiwanê bi Qizilbaşan re kete şerekî giran. Di vî şerî de mêrxasiyeke mezin nîşan da û seva wê Siltan Çepakçur da wî. Le mîrêmîranê Amedê Çerkez İskender Paşa îdara Çepakçunê ji deste wî girt û da deste memûrekî Osmanî. Li ser zilim û neheqiya İskender çû Stenbolê, le heft salan nikarî xwe bigihîne Paşe û li Stenbolê mir. Piştî mirina wî İskender vvîleyeta wî di navbera kurên wî de parve kir. Nehiya Xançûk û Akçeqeleyê da Mihemmed Beg. Cihên din jî bi şerta bê şer û kuştina birayê xwe dan Mûrad Beg. Tenê Çepaqçûr di bin rêvebiriya memûrên Osmaniyan de ma. 16 salan bi wî awayî dom kir. Piştî wê Mûrad Beg bi riza xwe kar û bar da destê kurê xwe Silêman.*157282)

Gundê Sewêda Çîmana Bİçûk

Di dema Silêman de, Sewêdiyan gelek caran li hember Sefawiyan şer kirin û mêraniyên mezin nişandan. Mirnîşînbi navê Silêmaniyê hate xwendinê. Dibe ku du sedemên wê hebin: Yekemîn; heta sala 1005/1597 an(i57‘284) Silêman Beg serokê mîrekatiyê bû û dibe ku ji navê wî rêberê hêja girtibin. E. Xemgîn dibêje: İskender Paşa beşa din ê mîrîtiya Sewêdî jî de bin destên Silêman; di dema wî de aramî û heyî hebû. Li deşta Menş Kurd amadekariya avakirina bajarekî mezin kirin. Dema bi Osmaniyan re diçû şer, herkes heyranê şer û mêraniya wî dima; bi tavbetî jî li hember Sefawiyan serkeftinên mezin nîşan dabûn. (l0O 3O3) Rêberekî wiha dikare bi hêsanî navê xwe li ser êlê bihêle. Ya din jî; ji neslê Ker Merwanê bûyî Xelîfê Emewiyan (744-750) ê dawî tê. Piştî ew kuştin, kurên wî yek

çû Hebe§îstanê yê din Ubeydûllah jî li Fîlîsîtîne dijî. Ew ji Filîstînê jî hatine Qulpê. Klên li wê herême li dora wan gîhîştibûn hev, heşt

komên bingehînin: Banûkî, Hewêdî, Dilxêran, Bociyan, Zîlan, Besyan, Zîkziyan û Berazan in. Hinek ji wan Ezidî bûn hinek jî misilman. Merwanî bi saya êlên Silêmanî hatin ba hev.°57'286) Wekî tê zanîn gelek nûser Sewêdiyan dikin nava Zîlan û wekî li jor jî xuyadike di nava wan de Zîlanî jî hene û Silêmanî di bingeh de wekî konfederasyon xuya dike. Silêmanê ku ew anîne cem hev û konfederasyon ava kiribû dikaribû navê xwe bide ser wê komê bi giştî jî. Iro Hewêdî, Boçî û Zîkziyan û hinek jî Beraz bi navê xwe yên qedîm li Xorasanê ne. Diyare ku yên din jî bela ne û hinek jê di bin navên din de dijîne.

Di dema lawê Silêmên Şah Weled Beg de, mîrîtiya Silêmanî kete bin desthilatdariya Osmaniyan. Komkujiyên ku paşayen Osmanî kiribûn avêtin ser Weled û fermana kuştina wî derxistin. Ew jî reviya Kela Qulpê û li wir mir. Kuiê wî Elî 40 salan Qulp îdare kir. Herêmên din ên mîrîtiyê ketin bin destê Osmaniyan. Kurê wî Siltan Huseyn di sala 1573 an de bi pejirandina Siltan Selîmê II an bû xwediyê heiêmê. (,00'303) Li ser dîroka tê dayîn de, di navbera Şerefxan û Xemgîn de ferq heye. Şerefxan di sala 1597 an de dibêje hîna jî Silêmanî li ser rêvebiriyê ne... Di arteşa Mu rate III an ku şandibû Ezerbeycanê de Siltan Huseyn jî hebû û hate kuştin. Di sala 1585 an de lawê xwe Zeynel derbasî cîhê wî bû. Piştre şeıû nav birayan dîsa destpêkir û di dawiyê de Bege Beganê Amedê, Quip û Batman di 1585 an de dane Zeynel. Piştre Seyid Ahmet hate rêvebiriyê; navbera wî begêbeganê Amedê xirav bû û bi ser wê de mîrîtî ji dest girtin û di sala 1595 an de dane birayê wî Zeynel.000"303* Demeke bi fermana Osmaniyan baca êlên mîna Besyan, Bociyan û Zîlan jî berhev kirin. Di wê demê de di navbera Osmanî û Sefawiyan de hertim şer hebû. Herdû aliyan jî di firsendan de zilim jî li ser gelê Kurd dimeşandin. Ji ber wê gel

ji alîkî diçû aliyê din. Baca Osmaniyan ya giran di dawiyê de bû sedama serhildanekê. Bi pêşengiya Şah Siwarê ji Besyan li hember Osmaniyan derketin. Di demeka kin de, bi alîkariya êlên derdorê hêzeka mezin derxistin holê û Osmanî têk birin. Li Bazîda girêdayî Erîvanê, Mîrnîşîna xwe ya serbixwe îlan kirin. Cara din jî Osmanî gerkirin, lê cara sêyemîn hêzeka mezin hat ser wan û Sewêdî belav bûn û komkujî pêkhat. Ji mirina Behlûl şûnde Emir Xan Beg derbasî cîh bû. Wî jî tola bavê xwe jî êlên dorxwe heynan û gelek kes kuştin. Di dawiyê de jî li Amedê bi dar ve kirin. Omer hat şûna wî. Di wê demê de bac kom nekirin û dewletê mîrnîşîn ji holê rakir. (100"3ü4>

Gor rîwayetan, serdarên Pazûkî ji êla Sewêdî ne, hinek rîwayetan jî ew wek Kurdên Iranê hesibandine. Kîjan rast dibe bila bibe, ew, di dema Tirkmen û Siltanên Qizilbaşan de di bin rêvebiriya hikumetên Kîxî, Ercîş, Adilcewaz, E^girtê de bûne.057'348* Li jor jî hate diyarkirin, ku Sewêda xaka Pazûkiyan ji dest girtine û tê wê watê ku serdarên Sewêdî koma Pazûkan birêve dibirine, tewerê nûser herdû koman wek hev dibînin bawerim ew diuê ji wê bê û piştî demekêjî mumkune ew bûnyek. Dîtineka din jî Sewêdiyan di nava Mamalûyan de nîşan dide.

Orhonlû, Mamalûyan wek 16 êlan nîşan dide: Kafir Kiran, Kizilli,

Sarilar, Qaracali, Alî Beylî, Kirik, Tûrgût, Elhac Alî, Selman Fakili, Nefesli, Yaqûblû, Qaracali, Beçîlû, Arîfe Gazîlî, Keller. (9[M5/St') Ewên girêdayî voyvoda Tokatê ji berê ve li sencaxa Bozok (Yozgat) koçber-nîştecîh bûn, Hinekan êdî cotkarî jî dikirin. Lê baca xwe nedidan. Êla Şarikli digotin em Seyidî ne; êlên Kirik û Kizil jî digotin em di nav eskeriyê de ne. Ji ber vvê, di sala 1693 (li 1691 fikirî bûn) an de ew rakirin Rakka, keviya çemê Belîhê. Min li jor jî gotibû ku mezinên êla Sewêdî dibêjin em Seyidî ne; eger herdû jî heman êl be, wê demê Sewêdiyan navêkî xwe jî Şarikli derbas dibe. Ew navekî bi tirkî ye û xuyaye ku Osmaniyan lê danî ye û ji

bo wê zêde wata xwe nîne. Birêz Hoko jî dibêje: Hinekên ji Suwediya ji Şervaniyan (522-704- Aras, Xezar, Mako) veqetîne. (32)Lê belê dîtina cîddî ya ku mirov li ser rawestî ew e; ku nîşandana Sewêdiyan ya di nava Zîlan de ne.

Dr. Fritz dibêje: Sewêdê ji eşîreta (divê federasyon/konfederasyon be) Zilan in û ew êla li sencaxa Bazîdê bicîh bûye û carna jî diçe Frîvanê. Milen wê: Zîlan, Ridkî, Dilçiri, Geltûrî, Berûkî, Sevîdî (100 kes), Dilkî, Pirhalî, Kurdikî, Cemaleddinî û Mamazeydî ne. (8) Seferoglû jî di bin sîwana Botan de nîşan dide û wiha berdewam dike: Yek ji milê kurmancên Dîcle ne. 300-350 sal in wek Bohtî "Zîlan" (deştî) tên binav kirin. Ew di Oxûznama Dede Korkut de ji Oxûzên "Uç Oklar" (Bayindir, Beçene, Çavûldûr, Çepnî, Salûr, Eymûr, Ala- Yûntli, Ûrexîr, Yixdir, Bûxdûz, Yîva û Kinik) tên nişandan. Kurmancî deng dikin. Li Agirî, Bazîd û E^girtê bi cîh bûne. 12 berên xwe hene: Zîlan, Birikî, Delikî, Pirekhalî, Sevîdî, Ritkî/Radikan, Geltûrî, Kurdîkî, Cemaldînî, Dilhirî/ Dilikan, Mamzidî û Celalî ne. Peçenek jî milê din ê kurmancên Diclê ne û bi zazakî deng dikin. (9, 63) Li Xorasanê herêmeka bi navê Radikan beye. Mela M. Bazîdî jî heman agahiyan dide.

Di salên 1850-56 an de rewşenbîre Kurd Mela Mehmûd Beyazîdî wiha dinivîsîne: "Ew ji eşîreta Zîlan in, li ser axa Bazîdê dijîn û carna diçin İran û Rewanê; çend qebîlên wan hene:

" (177-1)

Bi dîtina min ew 100 xane Sewêdî yen ku hatine Anatoliya Navîn in. Lewra, di wê serdemê de êla Sêvika ya girêdayî Reşiyan 180 xane û îro jî ew serhejmar û ferqa nabera herdû êlan xwe diparêze. Gor texmîna min Kurdîkî

dibêjin em girêdayî Walîdê Siltan in, li ser navê wê mizgeft avakirine û ji bo wê jî bacê nedidan û bi vî navî jî têne xwendin. Li dora Kilîsê jî êlên Izzeddînlî dijîn ku ew jî girêdayî Walîde Siltan Hassiyan bûn. Dîsa Reşî jî li wir bûn ku li Meletî havîn derbas dikirin û zivistanan jî diçûn Sûriyê. Lekvanîk jî li Çorûmê bûn. (15fv27' Îzzeddînî jî Oxçî ne.

C. Turkay dibêje: Suweydî Ekradi li Aksaray, Amed, Kilîs, Xinis, Qeyserî, Kîxiyê dijîn û ji taîfa Yorukani Ekrad in. (1M,'68y) Ji bilî wan deran Sewêdî û Cemaldîne li dora bajarê Qulp, Riha, Xarpût, Mûş, Xelat, Ercîş; hinek li dora Rewan-Erîwan, Kirgizîstan, Özbekistan, li rojavayê Kurdistan û Qonyayê dijîn.

Gundên Sewêdan îro li navenda Anadolê girêdayî navça Cîhanbegliyê ev in: Qendîl, Yayla Mewlîd, Beşkavaka Mezin û Beşkavaka Biçûk, Yayla Çolê, Çîman, Yayla Kîrlige-Eyşike, Qonax in. Ji wan Qendîlê li destpêka koçê hatine bi cîh bûne; gundên din jî 180 sal berî niha ji Aksarayê hatine. Li Aksarayê jî çar gundên Sewêdî hene ku ew: Qullero (Gokkaya), Çawdarli, Seydo Jêr, Seydo Jor in. Ji B. Biçûk Seyidê Tefîqî Hecî îbrem (63 salı) di sala 1997 de digot: Li Gundê Çawdarli li cem Qere Şamaz secera Sewêdan ji postê karxezalayê he-

Di wir de dini vise ku em ji Eli Pinara Amedê hatine Xarpûtê, ji wir jî hatine Sari Çîçek Yayiasiyê. Ji ber ku fîlîkê bizinan yê ji ber bacê dane dewletê ji wan re gotine "Qilveren-Qilorî". Cara siftê dema hatine navenda Anadolê jî li cîhê xwe niha bi cîh bûne, lê berî wan êlêka bi navî Mihînayê le dijiye. Ew bi Osmaniyan gilî dikin û bertîlê didin fermandarê mufrizê û ew jî Mihînan ji wir radike.

Di Şerefname de ji bo ola Pazûkiyan tê gotin; ku prensîbên perwerdê

ku Pazûkî, Çemîşgezekî û Xinislû dimeşînin ne gor îslamiyetê ye, bi misilman navkirina wan jî ne raste.1157352) Eğer mirov dîroka

Sewêdiyan di ber çavan re derbas bike, tê dîtin ku ew Zerdeştî ne. Li Xorasanê misilmantî pejirandin û beşekî di dema Ebbasiyan de jî bi vî awî derbaskirin, lê ketina wan a nav Şemsiyan û Pazûkiyan divê ew vegerandibin ser ola wan ê kevn. Eger bi tevahî nehatibin jî, ez bawerim ew bi dizîka ola xwe ya kevn dişopandin. Di nav êlên li Anatoliya Navîn de, taybetmendiyeka Sewêda jî ji rengê sor hêzkirina wan a. Elên der û dorê wê yekê didin ber pozî wan. Lê ew rengê sor jî îşareta wê yekê ku çawa ew ji Xorasanê hatine, piştî hezaran salan jî ew kevnoşopiya dom kiriye. Lewra hîna jî di rojên cejn û şahiyan de Xorasanî şalân sor li xwe dikin. Wekî din jî edetên li êlên din ên navenda Anadolê têne ditin, li cem Sewêdiyan

Qendîl

Di alî kincan de ti cûdahî di navbera Sewêdî û êlên din ên Anadolê de nîne. Lê ji alî devokê ve hinek cûdahî xuya dikin. Wek mînak:

Sewêdî Resî Kurdî

Çitorî? Çirdikî? Çewayî?

Aka wengwiha

Zari kurik zarok

Xûra xera xwe

AVŞAR

(Qereman-Sine Milî-Terikî-Celikî)

Berê jî min anî ziman, ku Avşar konfederasyoneka Kurd e; lê dîrok- nûsên Tirk ew jî wek Tirk û hîmê Tirkan nîşan didin. Ew milekî ji Kurdên navend li Xorasanê yê girîng in. Bi hatina Tirkan ya berbi rojava û tevgera qewman re ew jî ji cîhê xwe veqetîn. Li Asya Navîn an jî li dora gola Aralê

dijîn û wek Saka dihatin bi navkirin. Bi tevgera Tirkan re Kurdên li wê herêmê bûn du beş: Şaxek ji wan hate başûri? Kurdistanê ku di nava wan de Avşar hebûn. Yên din jî di bakûr û başûre Derya Kesk re hatin Kurdistan û Anadolê. Seferoglû dibêje: Yek ji 24 zendên Oxûzan e. Ji sedsala XVI an vir ve hatine Anadolê. Heta sedsala XIX an koçer bûn; paşê li Pinarbaşi, Sariz û Tomarza

Li mile çepê - Mehmet Avşar ji Deşta Amîk

Birez M. Bayrak jı dibeje: Beşek ji Avşaran bi reya Xorasan-Xuzîstane

hatin Anadolê.. .Avşar dibin du beş: yek, zendekî Oxûzan e û êlêka Tirkmenên

ku di dem a Selçuqiyan de ha tine Anadolê û nıştecîh in. Yên din: Avşaren koçer

ın ku ji di dema 1865 an wir de bi tevgeren Derweş u Ahmet Cevdet Paşa (Firka-ı

İslahiye) ten xwestin ku bi ah bibin. Ji wan re Avşaren Recepli te gotin. İro ew

li Qeyserı-Pinarbaşi, Sariz, Tomarza û li se gundan bi cîh bûne. Beri nîştecîh

bûnê (1865) ew di navbera Uzûnyayla û Ava Sariz, Pinarbaşi û Zamantiyê

de nêzîkî 3ÛÜ salan koçer jiyane, Zivistanan jî diçûne Kozan-Mîsîsê. (575'47) F.

Sumer jı di heman likre de ve: Avşaren li bakûrê Suriye ji alî sê malbatan ve

dihatin birevebirin: Kopek Oxûllari, Gunduz û Kut-Begî Oxûlari bûn. (131'275) Di

sala 1580 an de seroken Avşaran Receb, Bahrî û K. Minnet hebun; di sedsala

XVII an de Avşar bi nave Recep Oxûllari jı dihatin nasîn.

dikişine, lewra li Anatoliya Navın gündeki bi tene bi nave Kutiga heye. Xelkê

wı gundı, ji bili malbaten piştre tevlî bune, di esas de ji Avşaran in. F. Sumer

wan di nava Milan de jı nişan dide; le ıhtımaleke pir mezine, ku Milan jî di

nava zenden Avşar de ne.

Di nav koma Avşar de kıjan el hene em baş nizanin, bi qasî em texmîn

dikin; Celikı, Qereman, Milan û dibe ku Têrikî jî carna ketibin navê. Ji bo

ku Avşaran di dîroka Sefawiyan de roleke girîng lîstinê û li her cîhê Iranê

belav bu ne, gelek êlên din jî di navê de hebin. Ew hewceyê lêkolînên zêde ye û ronîkirina vê yekê dikare gelek xalên din jî ronî bike. Wek mînak: Sumer dibêje: Avşaren Eberlû li Qazwînê dijîn, sala (1628) Şah Safî helkişt ser text û wê demê berpirsiyarê Abiverd Cemşîd Siltan ji Eberlûyan bû; hinek milên wan li Halhal û Tarûmê dijînd131 296> Ew êlên ku tên qal kirin min serlêda; dibêjin em Reşî ne, heta gundekî bi navê Reşî jî heye. Lê di nava axaftinên wan de derdiket holê, ku ew girêdayî konfederasyona Reşî û ji êla Emarlû ne. Yen li Xalxalê dijîn jî Celikî ne. Di beşa Xorasanê de min hinek qal kiribû. Ew êlêna ji binemalên Dulqadiriyan in, ku piştre çûne Iranê. Nadîr Şah ji Av§arê Kirklû ya ji Abiverdê bû; lê di sedsala XVI an de ew oba di nava Avşaran de nayê dîtin û li Bozokê tê dîtin. (I31'298) Ew êlên ku ji Bozokê çûbûn bi tevahî Kurd in. Di dema Selçûqiyan de ew şaxa ji Xorasanê çûbûn dora Loristanê, ji

wir hatin basûrê Anadolê mîrîtiya Dulqadir damezirandin û ji vir jî dîsa çûn dora Reşt-Gîlane. Piştî gelek şer û nakokiyan, bi taybet jî erişen rêvebirên Safewî û nakokiyên di nava êlan de, xuyaye ewe vegeriyana Sêwasê. Ji vê jêderê ù ji gelekên din jî tê fêhm kirin ku Nadîr Şah bi eslê xwe Kurd e.

VVekî hemû êl û zendên din ên ha tine Kurdistan û Anadolê, Avşar jî gelek caran parçe bûne; sedema wê eriş û komkujiyên Osmanî û Sefawiyan bûn. Hinek Avşar di nava Boz Ûlûsan de hatibûn Anadola Navîn û bi piranî li eyaleta Qeremanê war girtibûn. Di dawiya sedsala XVII an de ew bi zorê koçê Rakkayê kirin, xanewanên wan piştre yek bi yek hatin rojavayê Anadolê. Di sala 1716 an de li Balikesîr-Mihalîçê hatin dîtin. (131'2S4) Ewên ku tên qal kirin ji komên mîna Têrikî, Zerikî û Lekan yek e; lê em tam nikarin tespît bikin kîjan e. Beydilê girêdayî îmanlû Avşari diçûn "beriyê", hinek diçûn Lazkiyê û hinek jî li alî Amedê bûn. Gelek jî jê çûn Iranê û gelek jî jê hatin Bala û Haymana- Sivrî Hisarê. Heta erîşa Firkaî İslahiye êlêka pir xûrt û maxrûr bû. Piştî hatina wan a ji Rakkayê jî, ew dest bi talanê kirin û ji wê bo di sala 1742 an de biryar hat dayın, ku peşengen wan bênîdam kirin. Dadaloglûyê bi nav û deng ji wê êlê ye. Di sala 1865 an de ew li zozanên xwe hatin bicîh kirin. (131'284) Ew Imanlû Avşari îhtîmelaka pir mezine ku Terikî ne.

Osmaniyan dema amadekariya perçiqandina êlên Avşar û Oxçû yen li Çiyayê Kurmenc (1865) kirin. Çûyîn û hatina êlan jî qedexe dikir; ji bo ku Avşar neçin cîhê zozanan, ji Kafqasya Çerkez anîn bi cîh kirin. Halaçoglû jî wê bûyerê dipejirîne: isal Firka-î İslahiye çûyîna zozanên Ûzûnyayla qedexê kir. Ela Avşar ji Çûkûrova diçû Uzûnyayla yê. Lê ji ber ku Çerkez li cîhê zozanên wan hatibûn bi cîh kirin, ew jî nedikarîn herin. Ji ber wê yekê Hecî Beg, êla xwe li dora Sarizê xwest bi cîh bike. (83-147) Hîna jî ew Kürdana li Sarizê dijîn.

Ela herî bi xeter Afşar bûn. Di salên 1846 an de 1200 xane û nêzîkî 6 hezar serhejmara wanhabû. 800-900 xane li Çûkûrova, 200-300 xane li Zamanti- Qeyseriyê diçûn germiyan. Ji bo zozanan jî diçûn Uzûnyaylayê. Serokatiya beşekî Çerkez Beg, ya din İsmail Beg, ya sêyemîn jî Qere Begê Topûz dikir. Di salên 1840 û 1850 an de ew di nava serhildanê de bûn. Osman Paşaye Mereşû

û meri yen wî yen ku ji bo bacê çûbûn ji alî Afşar an ve ha tine kuştin. (m~235)

M. Bayrak dibêje: Bavê min gelek caran ji gerokên Almanı yen dihatin li herêma me digeriyan bi kêf qal dikir. Heyet, di destpêka sedsala XIX an de hatiye gundê cîranê me Kirkisrak û bi Momikê Kose re li ser Elewîtî û şirova wî yê nia axifî ne. Gor kesên di komê de: "Kurdên li wir dijîn ji alî jiyan, ji alî dîtina wan ê li ser mirovahiyê, ji Ewrûpiyan 100 caran peşvetir in" gotibûn. Kesayetiya di nav vê komê de yek jî Hugo Grothe bû ku di sala 1906-07 an de "Gêra Mina Asya Pêsîn" de nivîsî. Li hemû gundên ku Avsarên Qizilbaçên li çiyayên Torosan de bi Kurmancî tê dengkirin. Qizilbaş li Anadolê li gelek deveran belav bûne. Li herêma çiyayî ya Pontûs, Plato Ermeni, Dêrsîm, li çavkaniya Firat, Qizilirmak, Afyonqerehîsar-deşta Dolaçay, deşta Mereşe dijîn. Ew qizilbaş in, dema Dede tê gund cem çêdibin û di kesayetiya Eli de

Cil û bergên Avşaran ên berê <Bî>™bù.. -[i rp32)

Wekî birêz Bayrak jî dibêje, girêdana bi ola Kurdan ya kevn re di nava wan Kürdana de heta sedsala dawî jî bi hêz bû. Heta wan salan ew girêdayî Ocaxa Sersortiyê bun û li hem ber rojê diayên xwe di kirin. Di roja îro de êdî ew Ocaxên pîroz nemane; di cîhê wan de Elewîtiya nêzîkî Sersoriyê hîna jî dom dike.

Ji alî hest, civakî, ziman, kevneşopî, olî û kincan de ti ferq di navbera

Avşaran, Reşî, Canbeg û Şexbizinen navenda Anadolê de nine.

MIRDÊS-TÊRIKÎ

Mezinên Reşiyan ji bo wata "Mirdês" dibêjin: tê wata kesên serok-rêber, kevirên bîran, bedew û gerden bilind...Di nava van wateyan de jî bi taybetî ji bo ciwanî/fodiliyê bi kar tê. Ji bo ku xweşikbûn, fodilî û bedewiya yekê/î bidin xuya kirin, dibêjine: "Pir Mirdêsî ye!" yanê gelek ciwan e, wek xezalan e...Dîroknûsê Irani Firdewsî jî dibêje: demeke camêrek hebû, him padişah bu him jî xwedî rindi bû, di alî edalet û efûkirinê de dereca wî bilind bû ku navê xwe Merdes bû?86-46* Eğer mirov tenê li ser peyva Mirdês rawestê, Mir-mirin e, dê jî dayik e, sî jî sî ye; dibe ku bê wata kesên di siya diya xwe de mirî ye. Yan jî ji bo diya xwe mirî ye.. .Di dïroka wan de bi wê yekê re tekîldar bûyerek jî heye ku emê paşe qal bikin. Şerefname jî dibêje: Mirdêsî li keleha Egilê û bajêr rûdinên, ji ber ko navê serokê Benîkilaban (kurê Kilaban), Mirdas e, kuiê Îdrîsê kurê Nusayre kurê Nasrê kurê Ce mil, "Mirdasî" hatiye gotin. (157'212) Ew jî

îhtîmalel

Mile Memedî Silêmen- Mirdêsî

Li navenda Anadolê di demên berê de, navê Mirdês bi yê Têrikî ve di heman watê de bi kar dihat. Iro mumkune ku ew zedê nayê zanîn, lê wiha bû. Ew çawa pêk tê? Mirdês zend yan jî konfederasyon e, Têrik jî êlêka ginêdayî wê yê? Yan jî du beşen zendekî ne? C, Turkay dibêje: Cemeeta Têrikan-Tilkan-

Tirekanli-Tinkanlû ji êla Mirdêsî ye. (160'7l2) Êlêka bi navê Tîtkanlû li Xorasanê jî heye û dibe ku beşekî Têrikan bin. Iddeayaka din ê ji bo navê

Têrikî jî dibêjin: dema koçberiyê ew zarokên xwe ji ber baranê dikirine têran ji bo wê ew nava lê d anîne.

Ji alî din ve, dibe ku têkiliya navê Badilî bi Mirdêsî û Têrikî re jî hebe; lewra gelek caran ew navana di heman watê de bikar tên û li kelêka hev tên dîtin. Ji bo ku navê êl û zendên Kurd gelek caran hatine guhartin, dibe ku ew jî yek ji wan be. Doç. Eroz dibêje: Têrikî girêdayî Bexdilî yên Oxûz in. (99'38) Bi dî- tina min, Badilî navê bala-bilind e; yan jî mirov dikare wek konfederasyonekê jî bibine. Yên din jî girêdayî vê rêxistinê ne.

Berê jî min nivisî bû, ku di dema Emewî û Ebbasiyan de, yek ji zendên Kurdên ku ji Mazenderan, Xorasan û Arranê anîbûn nava Anadolêbi cîh kiribûn Badilî bûn. Li ser vî navî em ti mîrîtiyan nabînin, lê li ser navê Mirdêsiyan di salên 750 an de li Egil, Palo û Çêrmûkê mîrîtî hene. Em dikarin bi rihêtî bibêjin ku navê yekemîn Badilî ye û piştre Mirdêsî tê, ji wî jî Têrikî veqetiye. Bê guman hin komên bi navê Badilî jî hene.

Di "Dîroka Amedê" de tê gotin; ku Mîrê Mirdêsiyan yê yekemîn, bi navê Pir Mansûr bîn Seyyîd Huseyn el-A'rac tê nasîn. Turba wî pêne km li rojhilatê Pîranê (Dîcle) li gundê Deran (Hocaalan) e. Li kîtaba li ser derî de: "Haza mescîd-î Mansûr bîn... 1611" dinivîse. (138"659) E. Xemgîn jî dibêje: Rîwayet dikin, ku ji koka apê Hz. Muhammed Ebbas tê ne. Begê yekemîn Seyid Huseyn El Arac e, ku berê li dora Çolamêrgê dijî; paşû hate dora Egilê û li gundê Pîranê bi cîh bû. Dergah ava kir û êla Mirdêsî û yên din li dora wî kom bûn. (im'183) Ti têkiliya Mirdêsiyan bi Ebbas re nine.

Gelek dîrokzan dibêjin: Merdaiyan, dibe ku navê Mirdêsiyan ji wir derketiye, milekî jî Şemsivan e ku cîhê wan ji Hema heya Şebîn Qerehîsarê dirêj dibe û bineciyên Meletî û Dêrsîmê yên kevn in. Heya dema Osmaniyan jî ew h dora Hema, Humus, Heleb, Ezaziye (Elezîz), Kilîs, Riha, Dîlok, Semsat, Meletî, Xarpût, Dêrsîm û dorên wan deran jiyane. Germiyaniyên ku çûbûn Kütahya jî ji wan bûn. Dîrokzanê Yûnanî Stepan

Asolîk di sala 1021 an de dibêje: "Jİ Dêrsîmê heya çiyayên Amanos hozên bi navê Şemsiyan dijîn û ew roj-perest bûn." Kurdên Ezdî ne. Hîn di dema Emewî û Ebbasiyan de li wir jiyane. Ji wan Kurdan tîren bi navê: Mirdêsî, Dasînî, Yesyaniye, Besnaniye, Mûsan, Şerqiyan, Germiyan û yên din hene. Ji bo Germiyanan gelek dîrokzan dibêjin ew Zerdeştî ne. Mîrîtiyên Elezîz û Kilîsê jî ji Kurdên Êzdî bûn û ji wan re Şemsî digotin. Di vir de pêwîste em binîvîsînin ku hinekên bi navê Kuleybiyan ên ji Iraqê hatine, di nava Mirdêsiyan de bi cîh bûne û ji bo vê jî dîrokzanên Ereb ji bo hemûyan gotine ew Ereb in. Lê ew yeka ne raste. Di derdora sala 1011 an de Ereb hatine aliyê Helebê û bi serokê Mirdêsiyan kuiê Mirdas Salih re hevkariyê kirine. Hebûna Mirdêsiyan ya li vê herêmê gelek kevne. Di heman demê de tîreka Mirdêsiyan li Egil, Palû û Xarpûtê dijî. (32) Li ser parçebûna Mirdêsiyan Mînorskî dibêje: îddea dikin ku di sala 1029 an de ji

Helebê hatine. (2'102) Wekî tê xuyakirin Heleb yek ji navenda Mirdêsiyan e.

Di beşa Beraniyan de jî min gotibû, Hoko li ser dîroka wan xaleka balkeş û hinek jî bi nakokîragihandibû: Ev Kurdên bi navê Mirdêsî di serê sala 900 an de, gava êla mezin a bi navê Mehmûdî ji dora Mûsil û Şehrîzor hatine dûrxis- tin ew jî di nav de bûne. (32) Gelo ew hatin bakûrê Kurdistanê bi şûnde vegerîn, yan jî ji bo zivistanê diçûn Mûsilê? Ew dema hewceye ku were zelal kirin. Ji welat derketinê şunde, li peş navê "Pîr" tên xwendin. Ew jî tê wê watê ku ew ola xwe vedişartine...Ji Hekkariyê dema hatine rojava, ji xwe re Pîran, Xarpût û zozanên wir kirin war. Ew êl û zendên hatibûn ev in: Aşmîşarat, Bala Be- ranî, Bergîlî, Delîkan, Babikî, Siwedanî, Birkanî, Mişkanî, Şikakî, Reswanî, Rêçwanî, Lewabî, Keşahî, Lewanî, Cemanî, Mihrîkanîkî, Wexşanî, Pismanî, Pûnyanî, Cezîranî, Mîranî, Bikanî, Dodanî, Dumkanî, Sêvkanî, Yûsûfanî, Sad- kanî, Mêrkanî. (32) Ez vê encamê jî derdixim ku wê demê ew êl û zend di bin sî- wana

Mehmûdiyan de kom bûne û ew serkeşiyû dikirine. Piraniya wan êlana piştre dê dewleta Şadî ava bikin û îro jî neviyên wan li navenda Anadolê ne.

Di wê demê de, yanî di salên 885-991 an de li Helebê hukumdariya Hamdan Oxûllari heye. Hükümdar jî Ebûl-Mealî Şerif bû ku ji wî re Sa'dûddewle digotin. Ew li Musûl, Heleb û Amedê hukumdarî ajotin û Ereb in. (1374) Di Erebbûyîna wan de gumanên min hene; lewra bûyereka balkeş ew îddeayên min piştrast dikin: Emîrê Merwaniyan Ebu Alî, qasidan dişîne Helebê û keça wî dixwaze. Dema bûk were di navbera bûkê û jinekê de diyalogeka balkeş derbas dibe, jinik ji bûkê re dibêje: " Behna xwe teng neke, tu dibî xwediya vvelatê bav û kalên xwe; tu dibî melîka Amedê, êdî girîngiyê mede tistên din. Li ser wîbingehî û îşareten din en zanyarî gihîştim vê baweriyê, ku Mirdêsî du şax in: Yek §axê Amedê, yek jî yê Helebê. Wekî nivîskar jî radigihîne yen herdû coğrafya girtine jî divê kalên Mirdêsiyan bin. Berê, gelê Farqînê ava bîran vedixwar; Seyfûddewle cara yekemin kanal çêkirin. Seyf, ji Hamdanan bû û serokê saxê Helebê bû. Navê xwe yê eslî Elî ye û di sala 916 an de ha tiye dinyayê. Di 935 an de dora Amedê heyna. Di sala 937 an de li nêzîkê Xarpûtê Bîzans têk birin. Piştî wê Heleb, Humus û Şam jî heyna. Di sala 967 an de li Helebê mir, lê iaşö wî li Farqînê hate weşartin.<13'157) Bi dîtina min ew Mirdês in ku li jor jî Mînorskî digot ew ji Helebê hatine.

Şerefxan dibêje: Mirdêsî berê li dora Helebê, di bin desthilatdariya Îsmaîliyên Misrê de dijîn. Piştre di navbera wan û Misriyan de dubendî derket, ji ber wê hîmê dewleta wan hejiya, ketin rewşeka perişan û belawela bûn. Piştre Salîhê kurê Mirdasê kurê Idrîs, ji vê dubendiyê îstîfade kir, êrî§ bir ser vê keleha han û xwest wê ji xwe re bike navend. Xelîfê Misrê esker şandin. Salîhê kurê Mirdas hate girtin û di sala 1029 an de ew bi kurê xwe ve hatin kuştin. Li ser vê, malbat û êlên wî, welatê xwe

terk kirin û hatin aliyê Egilê bi cîh bûn. (is 212) prof Unal li ser mîritiya Mirdêsî ya li Helebê wiha radigihîne: Tekoşîna misilman û Bîzansan ji 200 salan zêdetir ajot. Lê destpêka sedsala X an Bîzansî ji parastinê derbasî êrîşê bûn. Bi ser wê de Anadol kete bin destê Bîzans. Bi wê

nema, dest bi dagirkirina Sûriyê jî kirin. Li rojhilatê başûre Anadolê mîrîtiyên mina Merwanî (Amed), Mirdêsî (Heleb) û Numayr Oxûllari (Harran) jî bac dane Bîzans û bi wî awî xwe dane jiyîn. (118'10) Avcioglû jî dibêje: Mirdasiyan di 1051 an de xugî didine Bîzansan; di sala 1056 an de xwe girêdayî Misrê dikin. Mirdêsiyên Helebê li dijî Bizans û Selçûqiyan jî şer dikin û di wî şerî de, ji der dorên xwe jî alikariyê distînin. Lê di sala 1070 an de neçar man ku xutba sunniyan bixwînin. Ji dîtinên Prof û yên Şerefxan jî diyare, ku Mirdêsî ji zû ve li Helebê ne. Ihtîmaleka pir mezine ku ew jî di nava Kurdên ji bo tola Eba Muslim Xorasanî hatibûn de bûn. Piştî têkçûnê, ew belav bûn û Mirdêsiyan xwe li dora Helebê bi rêxistin kirin. Eewra berî dagirkirina Tirkan, ew li Helebê ne. Piştre ew ji vir diçin dora Amedê. Xala din a girîng jî îşareta ol guhartinê ye. Ew di sala 1070 an de xutba sunniyan xwendine, ku tê vê watê ew berî vê li ser ola xwe ya kevn bûne. Ew mantiqiye, lewra dema ji Xorasanê hatin hîna jî Sersor bûn, piştî mirina Eba M. Xorasanî jî divê demekê ew dom kiribin. Mateosê Riha dibêje ji sedsala IX an şunda, sunnîtî li herêmê bi peş ket.

Di sala 1070 an de wezîrê Fatimiyan, Selçûqî teşvvîk kirin ku Misrê heynin, bi ser vê Alparslan di riya Amedê re çû ser Sûriyê. Hukumdarê Helebê Mehmûdê kurê Mirdas Qadiyê Helebê şand ku bila peşwaziya wî bike. Dema ji Firatê derbas bû, Erebên jîr ji Siltan re ew gotinana gotin: "Bi Xwedê şikir ke, cara yekemîne ku Hukumdarekî Tirk ji wî rûbarî derbas dike." Mirdas kincên Oxûzan li xwe kirin û hat cem Alparslan.1131 1241 Wekî Sumer jî îşaret pê dike, ew hîn jî kincên Oxûzan-Kurdan li xwe dikirine. Ew jî îspateke din e, ku Kurdên îro li dervayê welat in ji alî

dîroknûsên Tirk ve wek Oxûzan hatine binavkirin. Di sala 1080 an de bi yarmetiya Melikşah, Muslîm dawî li deshiladariya Mirdasiyan anî. Di wan salan de li gorî Mateosê Riha yê, di "Namê Bûyeran" de nivîsandî, bi erîşen Tirkmenan herein di anarşiye de ma ye û birçîbûnê destpêkiriye. Bi hezaran mirov ji wir reviyan...

ji mirina Hr Huseynê Mirdêsî şunde, şûna wî kurê xwe yê bi navê F*îr Mansûr rûdinê (950-1021). Ev serok di dema Merwaniyan de jiya û alikariya serok Bad ê ji Kurdên Hemîdiyê kir. Wek tê zanîn serok Bad bi destê Erebên bi navê Hemdaniyan ên bajarê Mûsilê hate kuştin. Pa§ê Kurdên Helebê dawî dan desthilatdariya Hemdaniyan. Di sala 1021 an de serok Hr Mensûr mir; şûna vî kurê wî yê bi navê Pîr Mûsa bû serokê Palo, Çunguş, Çêrmûk, Osmaniye. Di dema Pîr Bedîr (1077) de Nisêbîn û Mêrdîn jî heynan. Di sala 1092 an de jî hemû Amîd, Farqîn, Heskîf, Xabûr kete dest. Paşû gelek erîşûn Selçûqiyan li ser welat çêdibin, Kurd aştiye dixwazin, lê bi ser nakevin. Di dawiyê de biryar digrin ku mirina bi ser bilindi ji jiyana çav berjêrî baştire. Di sala 1108 an de erîşûn Artûqiyan dawî li serokên Mirdasiyan tînin. Mirdas bûn sê beş: Egil, Palo û Çêrmûk.

1. Egil-Bûldûkanî: Hr Mansûr beiê li Çolemêrgê rûdinişt û paşâ li Hranê bi cîh bû. Şûna wî jî Pîr Mûsa rûnişt û di dema wî de Egil heynan. Şûna wî jî Hr Bedîr hat. Piştre welatê wan dikeve bin destên Selçûqiyan û Pîr Bedir direve cem Begê Meya Farqînê Emir Hüsamettin. Di êrîsa Alp Arslan de herdû jî şehîd ketin û tenê jina wî ya bi ducanan ma. Ji bo ku Selçûqî fêhm nekin, di nava hev de parolekê çêdikin, dema lawik tê jiyane bi tirkî dibêjin " Ewê ku em lê digerîn me dît-Bûldûk!" Bi ser wê de navê vê êlê wek Bûldûkanî jî derbas dibe. Dema Bûldûk mir bi dorê Emîr Ibrâhîm û Muhammed derbasî cîhe wî bûn. Ji Muhammed: Emîr Isa (Eğil), Tîmûrtaş (Kela Baxin û Palo) û Huseyn (Kela Berdenc û Çêrmûk) bûn. Neviyê Isa, Qasim Beg di dema Pezgewran de bû mamostê zarokên rêvebirên wan û

ji bo wê ji re digotin "Lala Qasim". Şah Îsmaîl di sala 1507 an de Amed heyna, lê Lala stû jê re xwarnekir û xwe avêt paş Siltan Selîmê Osmanî. Piştî heft salan dîsa bû xwediyê welatê xwe. (1M) Ji ber wê Şah, Xan M. Ustaclû şand ser Egilê û ew der girt. Heft salan bi zilm ew birêve birin. Niha sala 1005 (-1587?) ê koçiyê, Cehfer Beg kar û barê Egilê dimeşîne. (157217) Ango heta sala 1587 an ew mîrîtî dijî.

2. Palo: Eslê wan digihîje Emîr Teymûrtaş.

3. Çêrmûk: Emîr Muhammed, kela Baxinê da kurê xwe Emîr Teymûrtaş û kela Berdencê jî da Emîr Huseyn. Huseyn, ew kela parast. Cîhê wî Emîr Seyfeddîn hat, piştî sê nifşan jî Mihemmed beg hat ser text û Çêrmûk ji destê Qizilbaşan rizgar kir?137-224*

Li jor jî hate nivîsîn ku têkiliya Pezgewran bi Mirdêsiyan re baş bûye; di bingeh de ew taktîka mîr, paşa û şahen dagirkeran e. Dema dewleta xwe lewaz û Kurd jî bi hêz dîtine ji wan keçik dikirîne û bi vê rivê ji Kurdan îstîfade dikirine. Piştre jî bîra Kurdan dikolane. Ew yeka ji alî John Woods ve jî hema hema tê gotin: Hesenê Dirêj, bi keça Bûldûkanî Dewletşah re di ber salên 1442 an de zevvicî bû. (114'l56) Ji wê jinikê lawikekî bi navê Ûxûrlû Muhammed bû. (ll4‘ 160) Siyaseta Hesen li herêmên Kurdên li Armeniyê û Amedê; di 10 salên peşiya desthilatdariya xwe de, ji dagirkirinê pirtir, lihevhatin bû. Bi mîrîtiyên Kurdên otonom re tim di têkiliyê de bû. Heri zedê jî bi Malkişan re. Lê dîsa jî zewaca bi Bûldûkanî û Zerikiyan re kiri jî, aştiyeka mayînde û îstîkrar nanî. Wek mînak lawê Dewletşah Isa, peymana bave xwe û Hesen bin pê kir û di sala 1457 an de tevlî reqîbê Hesen, Cîhangîr bû,ill4'169) Di wan salan de xuya dike, ku Kurdên Mirdêsî bi Memlûkan ve di nava hevkariyê de ne. Lewra, di sala 1433 an de Baybarsê Memlûk çû ser Amedê, bi Qere Osman re ji gelek heftan bi şûnde peymanek çêkirin ku di wir de şert yek jî ew e: " Sozê dide ku careka din êrîşî ne xaka Memlûk, ne Heskîf û ne jî Begliga Egil ê

Kurd neke. (ll4'94) Ew hevkarî li hember firehbûna Osmaniyan û Beraniyan e. Mirdêsî li destpêkê ne di nava Beraniyan de ne. Lê ji neçarî tevlî Pezgewran dibin.

Di sala 1459 an de Palû kete destê Pezgewran. Barbaro, di sala 1475 an de Palû ziyaret kir û dibêje: "Ji kelaye ka bilind û 300 malan pêk tê". Pezgewr hilvveşiyan bi şûnde Palû kete destê Ku rdên Bûldûkanî yên Egilê. Ew ji koçberên diçûn zozanên Ermenîstanê bertîl diştendin.|11+106)

Beri şere Çaldiranê (1514) Selîm, ji Idrisê Bedlîsî re xeber şand ku ew amadekariyan bike û artêşê bigihîne hevdû. Idrîs jî Mehmet Xanê ku li Amadê

rêvebiriya Sefawiyan dikir qewitand û li gelek cîhên din jî di şer de bi serket. Di vê navberê de ji êla Mirdêsî Cemşîd Beg, Palu ji destê waliyê îran Bahdî Beydan girt. Bi vî awî beğen Kurd waliyên Safewî avêtin û herêm bi piştgiriya Osmaniyan kirin bin desten xwe,('9-79) Ji wan bûyeran mirov vê encamê derdixe ku Mirdêsî wê demê misilman in €1 dest ji ola xwe ya kevn berdane.

Di şere Osmanî û Sefawiyan de (1516) rêzên leşkeren Kurd gelek balkeş in: Di mile çepê yê arteşa Osmaniyan de, du komên Kurd hebûn: Emîrê Heskîfê Siltan Xelîl Eyyûbî, Sason-Mehmed Beg, Egil-Qasim Beg, Bekir Begê Bohtî, Mehmed Begê Zerikî, Şah Elî Mirdêsî Beg, Nasir Begê Silêmanî (Sewêdî), Bedlîs- Şeref Beg, Hîzan-Dawit Beg, Çemîşgezek-Emîr Pîr Huseyn Beg e. Di mile rastê yê Sefawiyan de jî: Riha-Dûrmûş Beg, Bîrecûk-Welî Xanê Pezgewr, Xarpût-Sarû Beg, Bexda-Kangiril Siltan û Hemedan-Çûka Siltan û Kelhur-Yegan Beg bûn. Di wî şerî de Kurdan, bi taybet jî Melîk Xelîiê Eyyûbî û Mehmed Begê Zerikî û Begê Bohtî qehremaniyên mezin nîşan dan.“38'501) Bere jî me destnîşan kiribû, ku begên herdû aliyan jî Kurd in; ew li ser cûdabûna mezhebî û bi zextên

dewleta Osmaniyan li hember hev derdiketine. Li aliye Sefawiyan Kürden Soran û Lek-Lor jî hene. Ji bo wê îspata heri baş fermana Osmaniyan ya di sala 1559 an de ye: Ji begêbeganî Amedê re! Zozanên Ulûs ên qedîm Melezgir û herêmên mîna Kirk Ahûr, Kesûr, Zerdikan û Belîhan in. Ew 200 sal in ku terine wîlayeta Qizilbaşan, ji wan jî ti xêr nayê, heta ew bi xwe jî Qizilbaş in. Lê me mirad kiriye ku em wana vegerînin. ..sal 972-1559.<1619) Ew jî nişana wê ye, ku beg û mîrîtiyên Kurdan bi zor û zexta dewletan beşdarî wan şerana dibûne û herdû alî jî Sersor in!

Gor Deftera Tahrîra sala 1560 an de em Mirdêsiyan li dora Semsûrê dibinin. Ihtîmaleka mezinê ku ewên li wir xuya dikin piştre hatin Navenda Anadolê. Gor wê: li nehiya Mûşar (Sincik yan jî Yarpûzlû?) mezraî Merdesî heye. (97 105) Li nehiyeya Komrî jî Îzolî xuya dikin, ku 355 kes in û gelek gundên din ên girêdayî Komrî jî hene. (9711t” C. Turkay jî dide xuyakirin, ku Mirdêsî di dema koçberiyê de heta Erzirûmê diçûne; divê ew tevgera di dema vvek Boz Ulûs dihate binavkirin be: Mirdasî-Merdisî Ekradi zivistanan diçûn Rakka û havînan jî diçûn zozanên Erzirûmê, Gawirdaxi Behremêza li Erxanî Madenê ye. Ji êlên Mirdêsî: Kesên bi navê Terikanli, Osmanli û Abdûlhayyoglû bi êlên xwe ve ji berê ve diçûn Meşta ya li alî Amedê. Ji çend salan wir ve ew li Meletî, Besnî û Semsûrê diğerin û gelê wir dikujine... (16ü'58S) Boz Ûlûsê li Arnêdê dijîn, ji ber sedema riyên dirêj û xerabe, di navbera zozan û zivistanê de, di sedsaia XVII an de hatin Anadol û Qeremanê. Ji wir jî li Enqere, Aydin û Kutahyayê belav bûn. Ewên li Enqere, Keskîn ji xwe re war girtin. (156~26) Ji wir tê fêhm kirin, ku Mirdês-Têrik e, dema Boz Ûlûs (1602) hatiye rojava di nava wan de bûne. Heta mirov dikare ji wê agahiyê navê peşiyûn wan jî texmin bike ku tê gotin Têrikan, Osman û Abdûlhay in.

Wekî min di beşa berê de jî nivîsî, di dawiya sedsaia XVII an de Osmaniyan gelek ferman derxistin ku Kurdên koçber bi cîh bikin; cîhê wan

jî çolên Sûriyê bûn. Yek ji wan jî bo Danişmendiyan derketiye. Cor lêkolîn û legerînên min kirî navê Danişmendî ji bo êla Têrikî-Mirdêsî bikar anîne. Li ser belavbûna êlê ev ferman hafiye dayın: Ji Waliyê Bexda Wezîr Ahmet Paşa re! Tirkmenên Danişmendî yen ji berê ve li Heleb û Edenê dijiyan çend sal in bûne koçer. Hinek ji wan li VVeranşehr, hinek li Aydin-Torbali û hinek jî li Su Sixirliya li sencexa Balıkesir û li gundê Orner, gundê Tîmûr Kapi û Vîranhanê diminin; talanê dikin û gel dikujine. Berê, Begê Qereman û Anadolê hatibûn wazîfedar kirin. Eger ew êlên han hîna ku neçûnê cîhên xwe yen berê, ji bo ku li ser riya tene, jê re derfet meke û wana bibe ciyê wanî kevn, sal 1102-1689. (lê1 %l Mezinê wê êlê digotin: Piştî hatina ji VVelat (Hama û Humus) çûbûn dora Torbali, Polathîsara girêdayê Sîvrîhîsarê; li wir jî ew tevlî serhildanekê dibin û beşekî jî tere Bala û yen din jî di sala 1859 an de li gundê Haymanê diminin.

Ew êla hanê carna jî di bin navê Boz Ulûs de kom dibe; ew kombûn nayê wê watê, ku ketine nav êl û zendekî d in; Osmaniyan ew li gor cografyayê bi nav kirine, ne li gorî peşiyen wan. Di defterên Osmaniyan de tê gotin: Hinek kesên ji civatên Sêx Ehmetlû û Huseyn Hecîlû yen girêdayî Boz Ulûsê ku li Aydinê nîştecîh û girêdayî eyalata Qereman in, gelek kes li dora xwe komkiribûn û reviyabûn Toyaca Haymana yê. Li wir, ji wan bac hate xwestin, lê ew gotin ku me mizgeft û xan ava kirine û em bacê nadin. Di sala 1731 an de biryar hate wergirtin ku wran bişînin Qeremanê.1156'86* Di sala 1730 an de li herêma Toyca, ji bo ku derbend şen bibe ji êla Boz Ulûs: Saki (Çanakli), Şöx Ahmedî, Huseyn Hecî yê girêdayî Oxûl Beylî û ji civata Küşne li Qereman hinek nîştecîh kirin.1156'111"1 Toycaya ku navê xwe derbas dibeîro di nava coğrafya êla Têrikî de ye. Xelk Tirkmenên Çatak-li ne, berê li Insûyû ya nêzîkî Haymanayê dijiyan. Ji ber rêbiiê Lewend û ji ber zilma yên kanûna datînin, nikarîn li wir bimînin û di rewşeka perişan de ji sencaxa Kirşehîie re hatin

şandin. Li wir li navça Selmanlû Kebîr û li Yozgatê Selmanlû Saxirê cîhê ku 100 sal vir ve xirab bûne

Li ser wê êlê C. Orhonlû agahiyeka girîng dide: Êla Tabanlı li Enqere, di sala 1842 an de wek 1230 xane li 30 gundan hate belavkirin û navçek jê hate meydanê.190'1131 Di vê demê de 1230 xane gelek e; lê dema mirov li gundên îro li navenda Anadolê baş lêkolîn dike; tê dîtin ku gelek malên Têrikî di nav gundên Reşî û yen din de hatine belav kirin. Hinek jê ji ber nexweşî û şer, berbi bajarên rojhilatê navenda Anadolê û Kurdistanê çûne. Piraniya gundên Reşî û êlên din piştî salên 1840 an hatin bicîh kirin. Têrikan jî em dizanin ku piştî Reşiyan bi cîh bûn (1859). Lewra hinek gundên Têrikî (wek Xabûra û gundê Tirko) di cîhên gundên Reşiya yen kevn de mştedh bûn.

C. Turkay dibêje: êlên mîna Badilî û Modanli girêdayî Mirdêsiya ne_(160-219) fqurc|ên Badili yen li Riha, Rakka, Nîzîpê rûdiniştin; ji wir girêdayî Mirdêsiyan bûn û rakirin dora Enqere. Kargin/Karkinli, beşeka Mirdêsiyan in, li Edenê û Helebê koçber bûn li Çanqiri û Sêwasê bi cîh kirin. (39) Adaman ji êla Mirdêsî ne; ew li: Enqere, Rakka, Erzirûm, Amed, Qerehîsarî Şarkî, Qers, Çildir, Tûtak, Patnos, Kilîs, Mereş û Antebê dijîn. (16(,'2li Badilî, li: Îskîlîp-Çorûm, Edene, Çêrmûk, Amed, Sêwas, Mereş, Erxanî, Sarûhan, Çildir, Harran, Aydin, Qerehîsari Şarkî, Kütahya, Fîrecîk-Gelîbolû, Bûrsa, Enqere, Kocaeli, Rûmelî, îbsala, Gûmûlcîne, Kemah, Pasîn, Riha, Trablûs Şam, Tîre-Îzmîr û hwd dijîn.1160' 219) Di sedsala dawî de tablo bi wî rengî xuya bike jî, berî serdema Emewî û Ebbasiyan navê mezin, an jî rêxistina mezin Badilî ye. Ela cara yekemîn li navenda Anadolê bi cîh bûye tê gotin ku ew Modanliya ye. Modanli li Çatalca, îbsala, Gûmûlcîne, Yenîce, Kocaelî, Bûrsa, Bîgayê dijîn.tl60 590) Ji wê jî mirov dikare bibêje Modanli li navenda Anadolê bi cîh bûne; lewra hîn navê wan li ser gundan e; lê piştre ew çûne Marmara û Trakya ku ti

agahiyên zêde li ser wan tunin. Cemeeta Bayindir jî girêdayî êla Bexdilî ye; ew li Sêwas, Kangal, Ulaş û Delîklfc^ê nêzîkî Kangalê diman. Paşe ji bo ku li Rakkayê bi cîh bibin ferman hate derxistin. Li: Kangal, Sêwas, Rakka, Kaş-Antalya, Ûlaş-Tarsûs, Heleb, Mereş, Meletî, Qereman, Çorûm, Hama, Aksaray, Hums, Aydin-Tire, Şam, Yabanabad-Enqere, Bexşehrî dijiyan. (160 230) Cemeeta Têrikan- Tilkan-Tirekanli-Tinkanlû ji êla Mirdêsî ye û li sencaxên Mereş û Meletiyê, Qeyserî, Enqere, Kirşehîr, Qonya, Kütahya, Mêrdîn, Erxanî, Çanqiri, Mûcûr, Hecîbektaş, Sêwas, Zîle, Erzirûm û Çildirê dijîn.<160 712/724) Ji berên Tabanlû, yan jî bi navê din êla Boz Ulûs ên mîna Yûlar, Qereman, îman, îrazi îman, Bayad û Şexan li Haymanê gundê Çomak û herêma Kûrûçoîê dihatin zozanan. Ew li Enqere, Qereman, Haymana, Çanqiri, Qers, Çildir, Amed, Rakka, Erzirûm, Bozok, Keşan, Malkara, îbsala, Gelîbolûyê jî hebûn. (160"706) Wekî xuya dike li her cîhê Anadol û Kurdistanê Mirdês-Badili hene. Komekê weqas pir ku mirov nikare hejmara wan tam bibêje. Lê eger Kurd xwedî dewJetek biyana, bajarê herî mezin ê ji wê êlê pêk bihata. Niebûhr dinivîse ku: Beydîlî li Riha nîştecîh e û 12 hezar konên xwe hene.,15649) Lê ew tenê yên herêmekê ne.

Gor rapora dewleta Tirk a kûr, Mirdêsen li Kurdistanê: 15.762 kes in,

henefî ne û kurmana diaxivin. Li Kolikê, lï gundên girêdayî nehiya Narincê mina: Ekîncî, Bozpinar, Akdoxan, Kavakli, Dûmlû, Alîdami, Gökçe, Baxbaşi, Eceler û Qeredûtê dijîn. Li nehiya Akincilara mezra Sû ver a girêdayî gundê Tûxlû, mezra Cavgûr û Bodînê hene. Tevlî serhildanan nebûne û girêdayî welatê me ne. (IU8'23) Li Dîgorê gundê Kirdimi 1316 kesên Mirdêsî dijin ku henefî û kurmanc in. (108"193) Li Bozova, Hîlwan û gundên wan dijîn, 2365 kes in û ji

Gundê Xebûra (Mirdêsî) - Haymana

MODANLI

Li jor di beşa Mirdêsiyan de jî min anî ziman, ku Modanli girêdayî vê zendê xuya dikin. Dr Frîtz jî radigihîne ku ew êla li herêma Mezandiranê jî heye û êla li Iranê herî zêde entelektüel e. (8) M. Zekî jî êlêka bi navê Moliktan jî d i nav Milan de û wek 500 trial nîşan dide. (msl) Ewên li Mazenderanê balkâş in, hewceye ku mirov wan di cîh de bibîne. Şerefxan jî agahiyan li ser Modkiyan dide ku em nizanin hemû yek êlên an na?

Dema Kanûnî wîlayeta Bedlîsê girt û Şemseddîn Xanê serdarê wê ji wir derxist û ber bi welatê Ecem ve penaber bû; heta sê salan êlên Bayikî (Bayekî), Modkî, Zeydanî û Bilbasî neketin bin fermana wî û li hember dewleta Osmanî serîhildan. Paşâ Siltan ferman da hemû mîrên Kurdan û li çiyayê Qaf dîsa êrîgî wan kirin, lê nikarîn bi darê zorê serî li wan bitewînin. Di dawiyê de ew bi pera û meqeman anîn rê.U57‘378)

Fdêka bi navê Melûkan jî heye ku bi dîtina min ew Molikê girêdayî Reşİyan e û ti têkiliya wan bi Modanli ve nîne, Sakaoglû dibêje: Di sala 1784 an de ji paşayen herêmê re mektûp tên nivîsîn; ku ji êla Melûkan Mûsa Kethüda bi 700 malan ve neçûye zozanên xwe yên kevn û hatiye Kirşehîr-Sariçîçek Yayla vê. Tê xwestin ku wana belav bikin. (129'62)

J

Girêdayî Haymana gundên mîna Katranli-Modanli (Tirk), Saatin Modanli (Tirk), Toyçayiri-Modanli Têrikî hene; Depekoy jî wek Modanli tê xwendin ku ew jî Têrikî ne.

BADILÎ-BEXDILÎ

E w nava ji ku girtine nayê zanîn, lê gor texmîna min dibe ku ji begê bi navê Bad girtibin; yanê êla-Bad û ji bo ku nêzîkî vê peyvê Tirkan jî kiriye Begdilî. Di beşa Oxûzan de jî min anîbû ziman ku ew ji navenda Xorasanê hatin. Me gotibû Yaka li çiyayên Balhan dijîn êlên mîna Oklû, Goklû û

Sûltanli jî girêdayî wan in. Lê ew nav bi tirkî hatine danîn, girînge ku mirov navê wan ên kurdî derxe hole. Ji wana Oklû di jêdêrên Safewiyan yên di sedsala XVI an de bi Eymûr, Salûr, Goklenan ve derbas dibin. Goklen li jora çemê Cûrcan rûdiniştin. Di wê komê de Begdilî, Bayindir û Kayiyên bi kêm hejmar jî dihatin dîtin. (131163) Lê ew navê Kayî balkeş ê. Gor nûserên tirkan ew Osmanî damezirandibûn... Lê ew wêne jî îspateka din dide ku Kayî êlêka Kurd in... Herçiqas ewê ji koma mezin veqetiyayî xuya bikin jî, tespîta wan a li wê herême û dema kevn ji bo me pir hêja ye.

Di esas de dîroka wan bi ya Mirdês-Têrikan û Canbegan ve gelek ketiyê nav hev; ji bo ku gelek jêder liser w'an bi taybet rawestiyane min ji hev cûda kir. N. Sakaoglû dibêje: Gor tê gotin Badilî yek ji 22 zendên Oxuzan e û ji 40 berî-êlan pêk tê. (129o4) Dema ji Xorasanê anîn, hejmara êlên wan hîn zêde bû. Yekemîn hatine Sûriyê û paşe heta Amedê belav bûne. Di nava êlên Yenî II û Tirkmenên Helebê de karibûne hebûna xwe berdewam bikin. (123"54) Fêwîste li

A A

vê Boz Ulûs jî zêde bibe. Sakaoglû bi berdewamî dinivîse ku ew hertim esker dane Osmaniyan. Ji wana berên mîna Boz Koyûn û Qereçêx di sala 1690 an de Elbistan dagirkirin û bûn pisgeiêkeka mezin ya hundirê dewletê. Di sala 1692 an de xwestin bişînin Rakkayê, lê li dora ava Balîc war hate dayîn. Ew ti caran nexwestin bi cîh bibin û berbi Heleb, Dîlok, Hatay, Çukurova û Sêwasê belav bûn. Ji ber polîtîkayên şaş ew jî terorîze bûn. Di kilaman de tê gotin, ku ew 80 hezar mal bûne û Xanedana Kose Paşa jî ji wan e. Ji alî Riha-Firatê ji ber mesela keçekê bar kirine (1700) Divrîxiyê. (,M'54)

Gorî Koçaş û Seferoglû radigihînin di dema Kanunî de Beydilî ji 40 êlan pêk dihat, girêdayî Oxûzan bû û navê berekê jî Kurd-ler bû û hejmara wê 204 kes bûn. (49/9l'27) Bexdilî, mile Tirkmenên li bakûrê Suri}« vê Bozok

bûn û tevlî avakirina dewleta Safewî jî bûn. Ji wan Sîncanan, Qere Sêxiyan û Çoplûyan talan dikirin. Di sala 1690-91 an de êlên Bexdîliyan hemûyan fermana ji Akçakale heta Rakka û keviya Belîhê bicîh bibin derket.

Helbestêk wiha dibêje:

Kurê Qadî, Yûsuf Paşa hat Dimja derewnek, derde min Bexdilî ye Bi 80 hezar mal li Rakkayê nîştecîh bibe Bexdilî şikand Tay û Muvalî (êlên Ereb

Ji min re Hizna Xatûnê silav bikin Ma kincên sor bêxê reş li xiveke Ma bi lawê xwe yê biçûk dilê xwe şa bike Qulingno! Fîrûz Beg çû Ecem

Gaziyên ji çola Rakkayê hatin!

Gula Rakkayê jî çitmisî?

Ji wir min xebereka nû girt:

Dibêjin Cerîd Bekirî miriye, raste?1131'3071

Ew kilama şîne ye, dîroka Badiliya ya sedsala dawî jî derdixe holê. Bi 80 hezar mal û bi datê zorê (Yûsûf Paşa) li Rakkayê bicîh kirin; şere bi êlên Ereb re, Fîrûz Begê çûye Ecem û parçebûna zendê... Xeberên ji eniya şer hatine jî didin xuyakirin, ku serok Cerîd Bekir miriye. Di vir de xala heri girîng peyva Cerîd e; gelo navê zendê yê kevn Cerîd bû an ew nava ji alî Osmanivan vê lê hatibû danîn? Tişte em ji vê fêr dibin ewe, ku Cerîd bi Badili ve û di cîhên din de Celikî jî di heman watê de ne. Lewra gelek caran, di jêderên Osmani- yan de wek Cerîd derbas dibe. Dibe ku navê Celikî ji Cerîd Bekir hatibe, elên li Torosan dijîn dibêjin; em ji Anadolê şandin Colap (Rakka, Hama, Hums) û xortên me dîl girtin, keriyên pezên me zept kirin ku ma em bimînin. 84.000 mal bûn; 30.000 bi Fîrûz Beg re çûn Acem. Yen din dîsa vegeriyan Anadolê. Niha li Antakya û Torosan dijîn. Di wê koçberiyê de zirara mezin Beydîliyan kişand. Li ser wî stran gelek in. Beşê ku çûbûn Ecem jî, îro bi piranî li Xorasanê dora bajarê Bojnûrdê dijîn.

Dema êlên Kurd ji Rakkayê reviyan, Yûsûf Paşa ji bo ku ew dîsa bibe cîhên berê hate wezîfedar kirin. Ji Beydîliyan: 400 neferên Topal Uşak û ji Barak, Bayindir, Mûsaca ve tevhev 3000 kes çemê Mûradê derbas kirin. Yûsûf Paşa çû ser wan û ew dawetî îskanê kirin. Kurdan guh nedanê û Osmaniyan êrîş kir û 600 neferên ji êlên Kurd kuştin. Yên man jî reviyan û xwe veşartin. (90' y2) Heman bûyer ji bo Reşiyan jî tê gotin, ji bo ku Reşî jî di nava Badiliyan de xuya dikin; dibe ku wê demê tevhevbûn.

Kazim Yeşîlgoz(39)dibûje êlên girêdayî Badiliyan wiha ne

Nav A 1 A I A -t « • •

Cine bere le dijiyan Cîhê ku koçber bûne

Begier Enqere, Qeyserî, Sêwas

Boz-Geyilî/Koyûn Sûrûç, Nîzîp, Mêrdîn Sêwas, Qeyserî

Bûldan MûsilQeyserî

Cece/Çeçe Sûrûç, Nîzîp, Mêrdîn Çanqiri, Sêwas, Nîxde

Çirik — Yozgat

Dellûru/Demîrcî Rakka, Riha, Amed Sêwas, Çanqiri

Dimlekî Yozgat, Qereman, Qonya

Erzînî Sêwas

Qadirli Hama, Humus, Nîzîp, Sûrûç, Mêrdîn Sêwas

Qereşexî Amed, Heleb Sêwas, Nîxde, Arapgir

Kartal/Kasan ? Develi, Enqere,Sêwas,Çanqi ri

Kayas ? Nîxde, Aksary

Mîrzan ? Sêwas, Kangal

Pencî-Bar/Pencbar Mêrdîn, Rakka, Riha Sêwas, Qeyserî, Kirşehîr

Tecerlî ? Qereman, Sêwas, Kirşehîr

Ulamiş/Ûlaş 7 Sêwas, Çorûm, Çanqiri

Rişvanlû, Rişvan Halep, En tep, Besnî, Meletî, Sêwas Qeyserî, Bozok, Sêwas İrişvanlû

Di vir de pê wüste bê gotin ku yan nivîskar şaş nivîsiye, yan jî beşek ji Reşiyan ketiye bin sîwana Badiliyan. Gorî bavveriya min, alternatîfa dawî raste; lew ra gelek êl di dema şere giran de mecbûr mane ku têkevin bin sîwana hevdû, yan jî îttîfaq kirine û di nav hev de mane.

Seferoglû jî dibêje: Tirkmen in û 12 beren xwe hene. Sünnî û Elevvî ne. Girêdayî Reşiyan e û tê fehm kirin ku ew jî konfederasyon e. Bi Kurmancî den- gdikin. 12 êlên Kurd ku navên tirkî li ser ev in: I. Tilkî, 2. Kiziri, 3. Haydarî, 4. Ketiyan, 5. Sadakan, 6. Kizkapani, 7. Qerehesenî, 8. Qereî, 9. Axcaî, 10. Tûrûçî,

11. Kaba 12. Mahkanî. (9i'6l,) Piraniya wan êlêna em girêdayî Atma, yan jî Sine Mili yan dizanin.

Ziya Gokalp jîji boTêrika dibêje, ji wan re "Bexdilî" digotinû li Carablûsê du êlên Tirknrenên bi navê îlbexli û Bexdilî hebûn. Bexdilî ji alî Yozgatê hatine û surgunê Rakkayê bûne û 80.000 malbat bûne. Tekîliyên wan bi êlên Doxerli û Bexdilî yên li Rakka û Rihayê ve hebûne. Ew ji heman cedî ne. Têkiliyê wan bi Afşaren li Qonya û Edenê re jî hene. (22) Tespîta Gokalp bi min jî rast tê, têkiliyên van bi Reşî, Celikî û Avşaran re jî rast in. Hinek nivîskar jî wiha tarît dikin: Ev êla digihîje 650 malbatan, li bakurê Amedê nîştecîh in, hinek Ermenî jî di nav de hene, rewşa wan baş e û şalen baş didirûn. (19178) 650 malbat in di navbera Hanî û Firat de nîştecîh in. Bi cilên xwe yên rengîn tên nasîn. Pir jîr û destgirtî ne y on- 177) Q- nava Milan de êla Têrikan 700 mal in û koçber in. Dîsa Nasi riyan

jî 70 mal in û koçber in. (19'180) Di nava Milan de Mirdês jî hene ku hejmara wan 1000 mal in. Canbegan jî nîşan dide, lê hejmara wan-nanivîsîne. (19'l8l) Li 250 km rojavayê Enqerê rûdinên û 400 malbat in. (19"189) Wekî ew nûseran jî diyar dikin, gelek êl û zend tevlîhev bûne.

Rapora êlên Kurden ji alî dewleta Tirk ve bi mora "pir pir dizî" İl ser bakûrê Kurdistanê agahiyên balkeş dide. Gor wê, li Gümüşhane, navça Kelkit û gelek günden wê ji êla Badilî 10.844 kes dijîn. Ew Kurmanc û şafû ne. (108149) Li Hîlwan û günden wê 3227 kes xuya dikin û şafû nel108-3095

Nêzîkî 20 hezar kesên Celalî ji ber Kûyû Murat Paşa reviyan çûn Iranê (1608), Şah ferman da ku 10 hezar ji wan li Biradost -Kela Dimdim- bên bi cîh kirin. Emîrxan jî ew peşniyaza qebûl nekir û şerekî bi xwîn di navbera wan de qewîmî bu. Di dawî de Emîrxanê Çengzêrîn têk tere. Di nav fermandarê erışkaran de Muhemmed begê Begdilî jî heye ku piştre kela Dimdimê stend û meşandina kar û barên wê kir destê xwe. (,57'513) Ew begê Badilî yê çûye Iranê, ku di kilama §înê de li jor te qal kirine.

CELIKAN

(Avşar, Bayat, Cerîd, Reyhanli)

Li ser navê wê êlê jî ti agahiyên berbiçav nînin; heta çend sedsalên dawî jî ew nava li tu deveran min peyda nekir. Lê wekî bê texmîn kirin ew nava ji şexsekî tê, gor mezinên Celikî Miçê Rawê Mamî Tozê (1915) nav ji Cel tê; ne dure ku ew Celal yan jî Cerîd be. Bi navê Celalî ve têkiliya xwe heye an na? Dîsa gor heman kesî ew Celalî ne, di nava êlên serhildeiê Celalî de ti şik tune ku Celikî jî hene. lhtîmala ji wir tê ya herî zêde ye. Navê Celika bi piranî, bi navê mîna Delika, Çelikan û Reyhanli ve tevhev derbas dibe ku hemû yek koke. Lê cama jî em şopa wan di nava zendên mezin de jî dibînin.

Ji wan zendana yek Avşar, yek jî Reşî ne. Li başûre rojhilatê Bexdayê çemê Tîbê heye, nêzîkî kaniva wî, li Loristanê Kelaka bi navê Bayat heye. Qazwînî, di dawiya sedsala XII an de ji bo hinek bûyeran qala wê Kelê dikin. Wê demê em dizanin ku Xuzîstan di destê Avşaren ji Xorasanê hatî de bû. Bi vê re girêdayî di sedsala XIV an de li bakûrê Sûriyê sê zend dijîn: Bayat, Avşar û Bexdilî. Di sala 1399 an de gelek Bayat li Helebê dijîn. Şam Bayadi, piştî lîmûr Tatar birin rojhilat, li Bozokê war girtin. Gelek ji Baya tan jî di avakirina dewleta Safewî de cîh girtin. Ji Bayatan Sevse-Sevindik Begî em nas dikin. Yek ji êlên Bayatan jî rêxistina Reyhanli bû. Di dema Kanûnî de ji 112 nifûsan bacê dida pêk dihat. Di heman demê de 90 malên xwe jî li Yenî Île bûn. (131'242) Bi dîtina min ew 90 mal, Celikiyên îro li navenda Anadolê dijîn in. Piştî salên 1516 an em wê êlê li Semsûr û navçê wê jî dibînin: Li Semsûrê navça Çelîkan heye ku navê xwe ji wê êlê nivîsiye, li Gergerê jî Reyhanli hene. Me bere jî gotibû ku ew di nava konfederasyona Reşiyan de jî xuya dikin. Ji bo ku ew êla heta sedsala dawî koçer û serhildêr bû, min xwest bi taybetî wê binivîsîm. Di sedsala XVIII an de Reyhanli li başûrû Sêwasê havîn, li Helebê jî zivistan derbas dikirin. Gerok Bûrckhardt dibêjê ew 3000 kon in. Di nava sedsala XIX an de ew li deşta Amîkê bûn; di sala 1865 an de ew li Reyhanliyê bi cîh kirini131 242'471 Hevalê min

ên Avşar ji Amîkê heb fin, navbera wan û me de ti cûdahî tunebû. Ji alî fizikî, ziman, ehlaq û rûhî de mîna Reşiyan in.

Dîrokzanê Kurd Şerefxan dibêje: Li Cezîrê 14 nehiye hebûn; yek ji wana nehiya Heytemê bû. Piraniya rûniştiyen wê Ermenî û xiristiyan in. Ela Cilekî (Cilkî) jî nîşteciyen wir in. Elên din ên Boxtan jî ev in: Dinbilî, Nûkî, Mehmûdî, Reşikî, Şexbizinî, Maskî û hwd. Ya rast ev e, ku êla Mehmûdî û Dinbilî ji gelek kevn ve ji Cizîrê derketine. (15715S) Li ser wê agahiya Şerefname mirov dikare bibêje, ku dema Avşar ji Loristanê der ketin, herî

kêm beşek ji wan hatin Cizîrê. El û zendên din ên li wir jî mirov mêzedike piraniya wan îro jî li dora Celiki- yan in û li navenda Anadolê nîştecîh in. Ji wê herême jî divê çûbin dora Helebê. Li ser wê K. Yeşîlgoz dibêje: êla Delkan li Helebê dijî, Bera vê Celikan jî li İsla¬hiye hate îskan kirin. Celika jî mezin bûn, bi xwe, li herêma îro bi navê Celikan bi cîh bûn. (39)

Celikî carna di nava Boz Ûlûs de jî tên nişandan. Le di sedsala XVI an de me gotibû, ku ji 15 êlên Reşiyan yek jî Celikî bûn. Di wan sedsalan de bûyerên hatine sere Reşiyan hatin sere Celikan û êlên din jî. Celikiyan jî ji ajo- tina Rakka para xwe girtin. C. Turkay dibêje: Êla Reyhanli berê her dem li Haremeynê dijîn, ji bo ku serhildan kirin, ferman hate dayin, ku bên ajotinê Rakkayê. Reyhanli, ji berê ve li herêma Helebê û li Xana Qeremûrtê zivistan derbas dikirin û ji bo zozanan jî diçûn çiyayên mîna Kargilik û Çobanoglû. Ji ber daxwaza wan bi xwe, ew li deş ta Amîkê hatin bi cîh kirin. Berên wê êlê jî ev in: Sarica, Tokel, Kabakî, Tonî, Korû, Sala, Oxçû, Qereehmedî, Bahadirî. Ew li Kilîs, Rakka, Sêwas, Edene, Mereş, Heleb, Meletî, Elbistan, Antakya, Qaza Kerker-Meletî dijîn. (16ü l40) Bi qasî ez dizanim ji wan heran Oxçû, ne êlêka Celîkiyan e. Dibe ku pismamê hevbin; ew êla di nava Celikan de xuyadike jî divê ji ber sedemekê ji Oxcûyan veqetiyabin. Berê jî min nivîsî bû, Osmaniyan ji bo ku êlên Kurd bi zorê bi cîh bikin, carna ji wan êlan serok an jî sewalên wan dîl digirtin. Ji bo wê êlê jî ew yeka pêk hatiye. Fermana bi vê yekê re tekildar wiha ye:

Ji waliyê Rakkayê re! Ji bo ku êl li Rakkayê bi cîh bibin û ewên li der doran perîşan bûne nîştecîh bibin, ji Çepnî du kes, ji Tacîrliyan (Oxçû-Dulqa- dir) du kes li Kela Amasya hatin dîl girtin. Ji Çepnî dîsa şeş kes li kela Çorûmê; dîsa ji Cerîd (Mirdês) du kes li Çanqiriyê, ji êla Koçekliyan sê kes li Kela Kala- cik û dîsa ji Cerîd Welî Bolukbaşi li kela Qeyseriye hatine girtin. Lê dîsa jî êl û qebîlên xwe neçûne îskanê. Di vê navberê de, êlên li Rakkayê

nîştecîh en mîna Afşar, Kiliç bi Tirkmenên Dulqadirî ve li deşta Amîk, çiyayê Seyhûn û deşta Ûrûcê gihîştin hev. Ji bo ew jî herin cîhên xwe fermaneka tûj hatibû derxistin, sal 1418-1705. (161"135) Fermana wan piştî Reşiyan derketiye. Lê piştî vegera ji Sûriyê jî, wekî êlên din Celikî jî bi cîh nebûn û demeka dirêj wek nîvkoçer ji- yan. Ew êla hanê di navbera Sêwas û Helebê de diçû û dihat.

Di derbarê vê çûyîna Reyhanliya yê Helebê de A. Refîk dibêje: Ji waliyê Sêwasê Mehmet Paşa û yê Mereşe Mekkîzade Huseyn Paşa û ji Silêmanê Reşî re emir! Reyhaniyên ji Yeni îi Tirkmenên Helebê, hersai bi mal û komên xwe ve ji alî Rûmê de dikevin tevgerê û ji bo zivistanê diçin Helebê û deşta Erîha. Reyhanı, ji eyaleta Sêwas û herêma Delîklî Taş diçin Helebê. Ji bo wê xelk tên kuştin, mal û milk talan dibin. Bêwîste rê li ber wan bê girtin...Çi pêwîst be bê kirin! sal: 1176-1763. Piştre, yanê du sal bi şûnde ji vê ıskana Reyhanî dest hatiye berdan û li ciyê wan Ela Ilbexî li Delîklî Taş hatiye bi cîh kirin/161' 2171 Lê piştî vê bidh kirine, ji bi şer diçin ser Celikiyan û wana bi zorê didin sekinandin. Gor mezinên êla Celikî yen li navenda Anadolê, ew ji Mereşâ- Dîlokê hatin Sêwasê û ji wir jî hatin Qonyayê.

Li başûre Qerekutukê (bawerdikim li Osmaniyê) geliyek heye; di dema Koroglû de êla Reyhanli ya ji Hama dihatiye û dixwestiye herê çiyayên Bînboxa, şer destpêdike û Reyhanî belav dibin, dişkên û vedikişin. Careka din nikarîne herin zozanan; ji bo wê, ji vê geliye re gotine Hama. Di dema xwe de li Bînboxa zozanên herî dewlemend di destê Reyhanî de bûye.,10"375) Wek tê zanîn ji bo Reşiyan jî Reşî Gedixi, yanê gora Reşiyan jî heye. Ela Reyhanî ji 3000 konan pêk dihat (Nîebûhr di sala 1766 an de wek 2000 mal nîşan dide û dinivîse ku ew ji Helebê heta Sêwasê diçûn). Ew li deşta Amîk zivistan û li alî Kilîs ri Azazê jî havîn derbas dikirin. Dema diçûn zozanan bi Begê Mereşe Tbrahîm re ketin şer û Ibrâhîm têk birin. Ji

bo wê dewletê dora wan girt û ew mecbûr kirin ku di sala 1780 an de li deşta Amîkê bi cîh bibin. Ewên ku dor girtibûn yek jî Orner Paşaye Reşî bû û Dulqadirên li Mere§ê rûdinên jî pira Mereşe ya bi navê Ak Kopru girtibûn.!l56'56) Di vegera Reşiyan de jî, Reşiyen nîştecîh, bi êlên din ve li herüber yên koçber bikar anîbûn... Ew Celikiyên ku li dora Helebê manî bûn. Beşek ji wan jî li dora Sêwasê hebûn û bi Reşiyan re diketin tevgerê. Ewên li Sêwasê dê paşâ bên Kûlûya Qonyayê.

Ji gundê Celika Miçê Rawê û Absev

Ji Reşiyan, berên mîna Barak, Qereçêxî û Bexdilî reviyan û tevlî êlên mîna Çelgan, Kiliç û Milan bûn û neçûn zozanên xwe û çûn dora Sêwasê û talan kirin, bien mîna Manda, Çelikan, Umranên li Alaca-xanê diçine zozanan. Wê yekê sîstema derbenda xi rave kiriye; gelê derbendi barkiriye Yozgatê. Ji bo ewlekariya rêva Bexda, di sala 1781 an de ji waliyên Sêwas û Bexdayê re hatiye nivîsîn, ku ewlekariyê pêk bînin. (12ÿ41) Gor gundiyên Celika (Atkafasi) gundê vvan 113 sal in hatiye damezirandin. Berî wê demê jî ew saleke li Altinekin (Zebil Atkafasi)-Qonya mane, bi dûre tên cîhê Gundî Kosê ya îro (girêdayî Haymana yê) û di dawiyê de herdû grind cîhên xwe bi hev diguhêrin.

Di sala 1849 an de Celikan ji alî Gurunê diçûn zozanan,(17l'25U) ew dîtin îro ji alî mezinên Celikî ve jî tê pejirandin. Ji Celikayên biçûk Miçê Rawê Mamî Tozê digot: "Em diçûn Sêwasê".

Gelên nîştecîh Celikî gilî kirin, ew jî bi cîh kirin. Di sala 1850 an de bi giştî 6554 xane ji Reşî, Afşar û êlên din ên biçûk hatibim bi cîhkirin.<171"250) Wê deme em dizanin ku Celikiyan nifûsa xwe bi gîştî 100 xane bûye. (171'247) Celikiyên li İslahiye îro li Nûrdaxi (Kömürler), Turkoglû û

Pazardkê dijîn. Girêdayî wan navçana günden mîna: Toplama, Mesthoyuk, Kirjçkal, Zencîrlî, Çamûrlû, Hîsar, Kulhaşkarahoyuk û yen din in ku bi gîştî 13 grind in.. .Celikan li İslahiye bi dh bûn şûnde, dihatin zozanên li Gurun û Kangalê. Li gundên wan navçana xanî avakirin, lê îro hema hema hafine terk kirin. Li Gurunê gundên mîna Beştaşli û Kangal-Havûz û Avşaroren e. îro Kurdên Celikî yen li Anadoliya Navîn ji Gurun û Kangalê re dibêjin yayle-zozan. Gundê Celikayan yê ku li Anadolê cara yekemin hate avakirin Kirkpinare. Li vî gundî Celikiyê ji sala 1882 an ve êdî mavînde bûne. (174‘27)

J

Celika-Kirkpinar

Kurdên koçer heta salên 1900 an jî desthilatdariya dewleta Osmaniyan qebûl nedikirin û li hember zexta seri hildidan û şer dikirin. Ji wan re mînaka herî baş Kurdên dora Çiyayê Kurmenc û Çiyayî Gawir û yên dora Hatayê ne.

Mirov dikare bibêje, ku Kurd, di esasê xwe de hezar sal in ku li hember Tirkan di nava têko§înê de ne. Ew raperîn cama kur, carna geş, carna fireh bûye, lê hîna jî berdewame...Dewleta Osmanî, Ji bo ku Kurd heta sedsala davvî jî sîstema wan qebûl nedikir bipelçiqîne, artê§eka taybeta bi navê "Firka-î İslahiye" ava kir û Derweş Paşa jî anîn ser. Navê arteşe jî li ser e, ku tê wata terbiye kirin an jî perçiqandin. Armanca vê arteşâ ji holê rakirina Ermenî û Kurdên li wê herêmê bû, ku guhdarî Osmaniyan nedikirin... C. Paşa (1822-1895) dinivîse ku: Derweş Paşa, ji Zeybek û Arnavûtan heft tabûrên nizamî hilbijartin ku ew eskerên herî baş bûn. Hemûyan tifingên şeşane di dest de bûn. Ji Gîrîd, Heleb, Mereş û Edene jî yek tabur tevlî Firka-î İslahiye bûn. Yanî 11 tabûrên piyade û aleyek jî

siwarî bûn. Lê Mîrlîva Paşa Ismaîlê Kurd ji Sêwasê bi alayek siwarî û çar tabûrên piyadê hîn nehatibû. Ji begên Gurciyan Arslan Paşa bi 200 eskerên Gurcî û Çerkez; Mehmet Paşaye Eleşgirû yê Kurd jî bi 300 siwarî dihate Me^ê. (83) Di vê êrîşê de jî xuyadike, ku dewletê dîsa Kurdan li hember Kurdan dida qirkirin. Wekî di buyera Reşiyan de bûye, di şere Celikan-dewletê de jî şaxû Celikayî wek Reyhanî têbinav kirin, ji Osmaniyan re rêbertiya neçîra birayên xwe dike. Paşaye Osmanî yên nijada xwe ji Balkanan wiha dinivîse:

Navê çiyayê Gawir re berê Cebel-î Bereket dihate gotin. Li rojhilatê wî jî çiyayê Kurmanc heye. Di newala navbera wan de xaka pir bi bereket hebû ku cîhê êlan bû. Ji êlan Tirkmen Reyhaniyê li deşta Amîkê bû. Delîkan û Çelîkanê Kurd jî li deşta Dumdumê zivistan derbas dikirin. Havînan her sê êl jî bi riya vê geliyê diçûn pişta Mereşe û ji wir jî diçûn Uzûnyaylayê. (83~124)

Di sala 1281/1865 an de Firka-î İslahiye ji Edenê derbasî Iskenderûnê bû. flêwîst bû ku me, heta Qeyserî, Elbîstan û Sêwasê îslah bikin. Me biryar da, ku di navbera çiyayê Gawir û Kurd kev in û tevgera leşkerî destpê bikin. Bi vî awayî me êl dikirin du beş. Lê pêdeviya me bi rêberan hebû ku me ji wan geliyan derbas bikin. Di vê navberê de mîremîrê êla Reyhanî Mûselzade Mistafa Beg hat û bi xwe re jî Paşo Begê nehiya Hecîler jî anî û kilîta çiyan da destê me... (83‘132) Reyhanî êla herî mezin a li Çûkûrovayê koçber e. Rêberên wan gelek bi Firkaî İslahiye re alîkarî kirin. (83'133) Ji agahiyên fermandarên ê^karan jî xuya dike ku yekîtiya wan tune û îxaneta hundir jî bîrineka mezin e...

Komên mezinê mîna Avşar, Sarkinti û sê êlên Kurdên biçûk ên mîna: Kirinti, Lek û Heciyan bi zivistane dihatin Kozan-Edenê û havînan jî diçûn zozanên Anatoliya Navîn. (83) Hersê êlên dawî wek Şêxbizin tên nasîn û beşek ji wan li Sakarya bi cîh kirin. Li Sîs-Edenê jî Ermenî û misilman dijîn

û zivista- nan dihatin wir, havînan jî tevî yên din diçûn. Li bakûrê Mereşû di newalekê de bajarokê Zeytûn hebû, 1300 Ermenî lê dijîn.<83) Gerokê Swêdî yê bi navê Kûylenstîerna. (188) dema li wan deran digêrê dibîne ku ji navça Zeytûn dû hiltê û dengê şer tê. Di wê demê de, êla herî mezin a herêmê Reyhaniyên li deşta Amîkê bûn û ji berê ve girêdayî dewletê bûn. Reşî û Avşar gelek bûn, ji ber wê, ew belavkirî hatin bi cîh kirin û ji bo wê bi dîqet tevdigerin. Di cîhkirinê de carna jî rêyên êla yên zozan û zivistanan li ber çavan hate girtin. Wek mînak:

3*ncf

Reyhanı 2000 xane û 12 ber bûn ku li deşta Amîkê bi cîh bûn. (9CM15) Êla Kurdên bi navê Delîkanli û Çelîkanli jî li navbera çiyayê Gavvir û Kurd de li deşta Dumdumê bûn û havînan di ser Merêsê re diçûn Uzûnyaylayê. Li navça Bey- lan a li deşta Amîkê êla Qerefakili hebû ku mîna Ulaşliyan hov û şerkeş bûn. Koma Delikan li deşta Dumdum zivistan derbas dikir û li wir nîştecîh bû û ji 8 beran pêk dihat û mezin bû. Günden li deşta Dumdum û nehiya Keferdiz ji Delikan û Çelîkan pêk dihatin. Van gundana me gîhandin hevdû û navça İslahiye damezirand û çend axayên wan êlana li vir bi cîh kirin û wezîfe dane wan. Meclîsa me ava kir re, mîremiranê Delikan Huseyn Axa û ji yen din yek me kire nûnere meclîsê. (83'141)

Kesên xerîb (Ermeni) li nehiya Çerçîlê wekî daniyan belav bûn û ser- hildêr çûn çiyayên Ulaşli. Diw di vê demê de be, li nava gundên Anatoliyê jî em gelek Ermeniyan dibinin. Xalê bavkî min H. MamîTozê digot 10-15 malên Ermeniyan di nava gundê me de hebûne. Piraniya wan ticarete dikirine û hi- nekan jî hostetiya xanî çêkirine dikirine. Piştre hemû çûnê bajarên mîna Sten- bol û Enqerê.

Gor rapora dewleta Tirk a kûr Celikiyên li Kurdistanê 6.000 kes in; Kurmanci axêf û henefî ne. Li gundên mîna Katranci, lncegedîk, Bayraktepe, Ortûlû, Toplamalar, Goluhoyuk, Zincirli, Kömürler, Belpinar, Gedîklî, Kirişal, Emirler û Mesthoyuk a girêdayî İslahiye dijîn. Raman: Ev koma, ji êlên mîna Tepkan, Kamazan û Torûnan pêk tê. Vê êlê, têkilî û xisimatiya xwebi Reşiyen ji mile Celalî yen ku li Elaymana, Kûlû, Besnî, Mereş, Meletî, Wan û Sûriyê ve heye. Di dema dawî de nîştecîh bûn. (108 142) Bi ser wê agahiyê ve, mirov dikare bêje, ku Topkanî yên li Xorasanê ji êla Celikan e. Yekê jî, dewleta kûr jî eşkere dike ku ew mile Celali yan e û bi vî awayî dîtina min piştrast dike. Ji xanedana Kozanoglûyan ku ieqaba xwe "Torûn" e, ji begê wan Huseyn axazade Meh¬met Axa, Derweş Axazade Ahmet Axa û kurên wî Hemze û Mistafa li Qeyse- riyê bi cîh kirin û meaşê wan hatin girêdan. (R31f>4t Heta demên dereng, têkiliya Celikiyên li Anadolê bi birayên xwe yên li İslahiye, Pazarcik, Belpinar, Zencîrlî û derdorên wir re jî hebûye. Gor mezinan, ji xismên wan ên li Kurdistanê re Qere Tbîş Oxûllari tê gotin.

Delikan jî 5500 kes in, li İslahiye, Kilîs û gundên wê rûdinên, Kur- manc û henefî ne. Delikan, êlên mîna: Melikan, Belikan, Heyderkan, Şerîkan, Mamatkan, Gulukan, Nûrikan digre nava xwe. Ew ji alî Derwê§ Paşa ve li gundên cûda cûda hatin bi cîhkirin. Vê êlê xisimatî û têkiliya xwe bi êlên Qo- nya, Kirşehîr û Sûriyê vê heye. (108'143) Delikan: 300 malbat in û koçber in; li dora Mereşe zivistanan derbas dikin. Havînan jî terin Torosan. Belikan: Li dora Mereşe dijîn, 300 mal in û Kurma ne in. (19‘187) Li Afşîne 2781 Celikî hene ku ew şafû ne.1108"208’ Beşek li Wanê, beşek li Ezingan, Erzirûm, Kilîs, Antakya, Meletî, Mereş û Dîlokê dijîn. (160'25) Celîkan li: Semsûr, Mereş, Bîrecîk, İslahiye, Rûmkal a-Rakka, Kilîs û Dîlokê dijîn. (160‘271) Êlên mîna Nûdûr, Doxan, Gokrîşan û Cili- kan li Mereçê rûdinên; dizanin ku ew Tirkmen in iê bi kurmancî dengdikin.

Delikan û Belikan jî hîn koçber in: Havînan li Torosan, zivistanan jî Delikan terin Kilise, Belikan jî terin geliyên Mereşe. (104~41)

Bayat ji Reyhaniyan zêdetir xwedî wan êla e: Kuzu Güden, Îl-Dîlek, Beçîlû, Yaban, Melek Hecî, Gozucek. Ji wana Kuzu Güden pişti talanên îi Ak Kişla Qeyseriyê bi cîh bûn. Bayata, Pehlîvanli bi Reyhanliyan ve temsil dikin. Boy Begê Pehlivan li günde Beg Obasi ya girêdayî Kirikala Enqerê dijî. Di sala 1707 an de mizgefta gund avakirine.{l31'247)

Elên Tirkmenên mina Cerîd û Tecîrlî li Payase/Iskenderûn zivistan der-bas dikirin û havînan jî diçûn Uzûnyaylayê, Bi çûyin û hatina van re gelek dizî û talan jî dibû û li Mereşe ew tişt dihatin firotin. Ji bo wê, esnafên Mereşe gelek kar dikirin. Di wê çûyin û hatinê de bi taybetî jî Çelîkan û Tecîrlî li wan deran belav dibûn û xelk dişelandin û tişten desten gel digirtin. (83'125) Mirov dikare li wir texmînek bike ku Tirkan şûna Celikan, peyva Cerîd, Reyhanli, Kabalar bi kar anîne.

Gor mezinên ji Meletî, îro li vî bajarî êlên girêdayî Reşiyan jî wiha ten rêzkirin: Atmiyan, Çeqêla, Xelka, Delika-Celika, Bîstika û Sêvikî. Dîrokzanê Kurd ïzady dibêje: Kürden li Xalxal-Zencan jî: Delikan-Kurmanc û sunnî, Canpolat, Kilîsanî, Şatranî ne. (154‘164) Min çend caran hewl da ku herim Xalxalê lê nebû, hêvîdarim hinekên din herin wir û li ser wan agahiyên zêde ragihînin. Celikiyên li navenda Anadolê li gundê Celika (Atkafasi), Kirkpinar û Hesarê belav dibin û hinek malbatên li Gundê Qutiga jî Celikî ne.

Hesar

Ji alî ziman, kine, ol û civakî ve wekî Reşiyan e. Dema xwe tarîf dikin, pesnê xwe wiha didin: " Merin malên Molika, herin goren Celika!" Lê her gund û êl bi awakî nêzîkî vê xwe mezin dikin...

ÇEMÎŞGEZEK

Ji ber coğrafya xwe ya bilind Dersim di her dema dîrokê de bûye sinca Kurdan. Bi taybetî jî Kürden îro li dervayê welat dijîn bi piranî li wir kombûne yan jî ji wir belav bûne. Li Dersime navça Çemîşgezeke bi koma êlan yê bi vî navî jî navdare. Gelek êl û zendên Kurmanc, Kirmanc û bekan li wir bihevre hevkariyê kirine û bihevre tekoşiyane. îro li Xorasanê jî zendekî pir mezin ê bi navê Çemîşgezek-lû heye ku ji herêma Dêrsîmê çûne. Dîsa di alî olî de, êlên li vir yen herî dawî ji ola xwe yê kevn dev berdane. Di alî ziman û kincan de jî gelek vvekhevî heye, ango bandore lihev kirine.

Prof. M. Alî Ünal dibêje: Herêma Çemîşgezek di serdema neolitik de jî cîhê xanî nîşîne bû. Di girê Pulurê de tebeqa dawî ji dema neolotîk ve maye. Tê texmînkirin ku di destpêka serdema Tüne de, êlêka girêdayî federasyona elan li wir jiyaye. Gel debara xwe bi cotkarî û ajalan xwedî kirine derbas kiriye û neçîr karekî dûyemîn bu. Ewên li wir rûdiniştin sifir dihelandin û jê serê mertal û tevran çêdikirine. (llw 7) Ti guman tune ku ew êlên Kurd bûn û heman nivîskar dibêje: Mûşkiyan jî li wir di sedsala IX an BÎ de di navbera Murat û Tirat de dijîn. (118'8) Bi vî awayî erdnîgariya Dêrsîmê, ji Kürden ji ber êrî§ên Ereb, Asûr, Xelkên Deryayê reviyabûn re bûye war û ew yeka heta roja îro jî berdewame. Beri hertiştî êlên îro li vir dijîn bi yen di her demên berê ve hevdû digrin. Elen îro li Xorasanê, navenda Anadolê, Lazqiyê û cîhên din dijîn hîna jî parçên xwe li Dêrsîmê hene. Ji van mirov dikare navê Reşiyan, Alan, Canbeg, Şexbizin û gelekên din bijmêre. Va di dîrokê de zêde şop hîştî û li vê herême jiyayî yek jî koma Mûşkî ye. Wekî di beşen derbasbûyî de jî min got, ew Kurd in, hîna jî êl û bajarên bi vî navî hene. Bi vî awayî Berî Mîladê ew herêm hertim di bin de- sthilatdariya Kurdan de bû. Di ber hatina Tirkan ya rojava jî ew herêm

bû kela Kurdan û gelek êl û zendên ji navenda Xorsanê, Gîlan û Qefqasan hatibûn xwe avêtin çiyayên Dêrsîmê.

Bi taybet jî bi hilweşandina dewleta Şadî re zend û êlên ji wir belav bûbûn ha tin Dêrsîmê. Berî vê jî êlên ji ber Tirkan reviyabûn ha tin vê herêmê û gelek mîrîtiyên Kurd avakirin. Di serdema mîrîtiyên Kurdên li Anadolê û Kurdistanê hatibûn damezirandin de, li Dêrsîmê em êlên girêdayî Germiya- nan dibinin. Dîsa federasyona Milan (îhtîmaleke mezine ku di nava Germi- yanan de bû) û gelek êlên din jî ewder ji xwe re wek war girtibûn. Vê yekê nûserên Tirk wiha radigihînin: Desthiladariya Çûbûk Oxûllari li Çemîşgezek, Xarpût û dora wan deran heta sala 1113 an berdewam kir. Piştî Çûbûk, kurê wî Mehmed derbasî cîhê wî bû. Hinek jî dibêjin Çûbûk û Tirkmenên girêdayî vvî Germiyanî demekê li Meletî ne,im"U) Germiyanî wek tê zanîn Zerdeştî bûn û êlên heta roja îro li Dêrsîm û li dervayê Welat dijin jî, vê kevneşopiye kêm zêde didomînin.

Wekî hate gotin Kurdên li vir, girseyekî ji Germiyanî û Şadiyan ve ma- bûn; ji bo vê jî gelek zend û konfederasyonên Kurdan di navê de hene. Ji ber

ku ew bi dehan salan şer kirine, di şeran de pijiyane, milekî pir şervan û stû nizm nedikiriye. Ji ber vê yeke beta dema Osmaniyan ew serbixwe jiyane. Bi dîtina min derba herî mezin şere olan li wan xist. Lewra di serdema Sefawiyan de Şah pişta xwe de wan Kürdana; ew parçe kirin, li gelek beşen ji hev dur bi cîh kirin (Loristan û Xorasan) ku pê welatê xwe bipanêze. Di encama vê de ew hêza mezin bê taqet ma. Eger ew yeka pêk nehata, ew dikaribûn ji serxwebûna Kurdan re rebertî bikirana...

Prof. M. Alî Unal dibêje: Gor rîwayetên mezinan, di dema Alp Arslan de Çemîşgezekî di bin serokatiya Emîr Salik Alî bîn Qasim de li Erzenî-Rûm (Erzirûm) û wan deran dijîn. Bi Gurciyan re dijmin bûn. Di sala 1161 an de, di şere bi Gurciyan re Emîr Saliq dîl ket,(n8"34) Şerefxan jî li ser wê bûyerê wiha dinivîse: Emîr Salîqê kurê Eliyê kurê Qasim, ku ji şaxeke

seltanata Selçûqiyan bûye, di dema Alp Arslan de, desthilata Erzen-î Rûm û derûberên wê di destê wî de bûn. Di navbera wî û Gurcîstanê de dijminatî hebû, koka wê kevn bû. Di dawiyê de di sala 1162 an de dîl kete destê Gurciyan. Lê ji bo ku xuşka wî jina Şah Ermen bû (fermanrewayê Tirkmenên Xelatê) û wî Şahî gelek diyarî ji Gurciyan re şandin û ew rizgar kir. Wek tê zanîn di wê serdemê de di navbera Şadî û Gurciyan de gelek şer hebûn.

Destpêka dîroka wan ê li Dêrsîmê Dr. Frîtz wiha radigihîne: Di dema serokê vê komê Melîkşah Bin Muhammed de (1199) li dijî Selçûqiyan raperîn kir û dîl kete destê Kiliç Arslan û hate kuştin. (8) Ji ber navê vî serokî ji van Kürdana re "Melkîşî" jî tê gotin. Li ser vê babetê Şerefxan dibêje: Di sala 1202 an de Erzirûm kete destê Selçûqiyên Rûmê.<l57'2üü) Ihtîmaleke ku piştî vî şerî bi tevahî dev ji aliyê Ezerbeycanê berdan û li dora Çemîşgezekû bi cîh bûn.

Van Kürdana beri Islamê gelek caran bi Ermen û Gürcan re îttîfaq kiribûn, lê dema bi xwe li Arranê man jî bi sedsalan li hember wan şer kirin. Di salên 1202-1226 an de serokê Melkîşan keça xwe da Selçûqiyên Qonyayê. Ew yeka di navbera êl û mîrîtiyên Kurdan de, baş nehate pêşwazî kirin. Bi çavekî xerab li vê bûyerê nihêrtin. Bêguman ew yeka bi xwe jî balkê§e; gelo çima keça xwe dabû? Ew ji têkiliyê wan û Tirkan ji §erê Aniyê dihat, an jî ew li ser hinek tıştan bi Tirkan re lihev kiribû? Bi dîtina min lihevhatinek xuya- dike, Tirkan piştî vê hevkariyê berê xwe dan rojava. Dema bûk birin, di rê de Danişmendiyan bûk revandin û Selçûqiyan dawî dan mîrîtiya wan. Lê Melkîş li dijî Selçûqiyan seri hilda, welatê xwe rizgar kir û komela xwe ya belav bûyî kom kir. Yanê ji sînorên Şadiyan heta sînorên Danişmendiyan kete destê wan. Bi Eyyûbiyan re îttîfaq jî kirin, ku wê demê Eyyûbiyan ji Yemenê heta Tîflîsê kiribûn bin destên xwe. Li ser navê xwe û Eyyûbiyan xutbe xwendine û pere çap

kirine. Di dema Melik Mehmût Melkîşî de (1233) gelek erişen Ereb, Selçûqî, Menkûçî û Eretniyan pêk hatin. Lê di salên 1257 an de ew mir, kurê wî Melîk Hesen bû serok û di dema wî de gelek êlên din hatin nav wan. Piştî demekê aştiya nav gel xira bû, wî serokî ji êlên Şerwan, Gîlan û Dînorê îttîfaq xwest.

Di sala 1438 an de Şex Hesen dibe serokê mîrîtiyê û li dijî Pezgevvran gelek tekoşîn dike. Pezgewr ji aliyê Ezerbevcanê hatin û li dora Sêwasê bi cîh bûn û eriş tanin ser Çemîşgezekiyan. J. Woods dibêje: Kürden Çemîşgezeken Malkişî li ser dû şaxen Firat, Mûrat û Qeresû de herêmeka fireh idare dikirin. Ji Ezinganê bigre heta Dîlokê riyên ticarî kontrol dikirin. Serokê wan Sarû Şex Hesen, di çerê navxweyî yê Pezgewran de li alî Hemze bû, lê di sala 1456 an de tevlî Hesenê Dirêj bû. Kurê Hesen Siltan Xelîl Suhrab bi keça Şex Hesen re di sala 1459 de zewicî. (U4169) Şex Cüneyt ji al ika riya vê komela serok Suhrab ki- riye. Gava Hesen va yeka dît, yanê îttîfaqa Kurdan dît, xuşka xwe da Cüneyt. Di vê demê de mirovên Şöx Cüneyt di navbera hikumeta Çemîşgezeke de pir bi rûrnet bûn. Piraniya komelê mirîden vvî bûn. Ew jî sersortiya vvan dide xuy- akirin.. .Fatih, Hesenê Dirêj têk bir şunde, xwest welatê Kurdên Çemîşgezek jî bigre, lê Kurdan bi mêranî welatê xwe parastin û Fatih ji Kemahê derxistin. Ji ber vê sedemê neviyê Fatîh, Yawûz li Tebrîzê serê kurê serok û fermandarê wî jêdike. Di sala 1477 an de Ristem Paşa yê Melkîşî dibe serok û dema wî hemû bi şerû Osmaniyan ve derbas bû. Şere wan bû şetû du ol û du mezheban. Di vê demê de ji îranê jî gelek kes dihatin alîkariya Kurdan, lê Osmaniyan dubendî di navbera Kurdan de derdixistin û ew li dijî hev jî şer dikirin û îttîfaqa wan hildiweşiya. Di sala 1501 an de Şah Îsmaîl hat Baybûrtê; ji Hec Ristem Paşayâ Melkîşî re got: Tu vî welatî ji mirovê min Nur Elî re berde ku em bikaribin bihev re dewleteka mezin ava bikini. Bi vê teklife re serok dev ji welatê xwe berdide, tere Tebrîzê û

ji Iraq û Xorasanê re dibe rêvebir. Di sala 1514 an de ji alî Yawûz ve tê kuştin Ci dawî li hikumeta wan tê. Yawûz ji wê malbatê 40 rêvebir kuştin û pa§ê dewlet kete bin destê Osmaniyan. (101185) Selim li ser xaka Osmanî Kurdên Şîa, Şah jî Kurdên sunnî dikuştin. Ji şerû Çaldiranê bi şûnde, Hec Ristem Begê Çemîşgezekö (serokê Kurdên Xorasanê) û 40 kesên din ji serokên Kurd li Çaldiranê xwestibûn ku bi Siltan Selîm re aştiye çêkin, lê wî bi nemerdi serê tevan birî. Kurdan mezheba Şîa/sersor ji xwe re pejirandin û bi tevahî hevkariya Sefaw'iyan dikirin. (14510) Bi dîtina min, Kurdên dervayê welat ew mezheba ji xwe re nepejirandin; yen ku ew mezheba afirandin Kurd in. Di dema Yawûz de jî serokê xwe Hecî Ristem Beg bû, li gel Şah Îsmaîl li dijî Yawûz winda kir û hate daleqandin. (8)

Şerefxan dibêje ew ji sê şaxan pêk tên: nêzîkî 1000 mal ji wan di bin xiz- meta îranê de ne; grûbek din a ji wan jî ketin nav zabitên parêzgerî yên Şah. Qis- mek ji wan di eyaletan de bûn berpirsiyarên serbixwe. Welatê wan ji alî herkesi ve wek Kurdistan dihate nasîn. Ji vê mebest tenê wîlayeta Çemîçgezekê ye. 32 kele û 16 nehiye di sînoran de hebûn û di dema Cengîz Xan, Tîmûr, Şahrûx Mîrza û Qere Yusif de jî ew herêm serbixwe bû. (lt’720l) Tenê di dema Emîr Yal¬man de dewlet kete bin zilma Pezgewran, ji bo ku va koma girêdayî Beraniyan bû û ji bo ku bêhêz bîkin çi ji destê Hesenê Dirêj hat dikir.® Piştre Şâx Hesen xelk li dora xwe komkir û Pezgewr ji welatê xwe derxistin. Hesenê Dirêj pir hewl de ku fermanrewayên Kurd ji hole rake. Ji bo vê êla Xerbendelû yê şaxekî

Beraniyan bûn şand ser Çemîşgezek û wan ew cîha girtin. (15A202) Wekî em di- zanin ew êl/koma jî Kurd in; bi vî awayî wî Kurd bi Kurdan didane kuştin. Eğer deste Kurdan têde nebûya mümkün nedibû ku wî careka din herêm bi- girta. Tro jî ew politikaya ji alî her dagirkenên welatî me ve tê

şopandin...Xaka Melkîşaye weqas fireh bû, ku Kurdistan bi Çemişgezeke ve dihatin heman watê.

Çemişgezeke di sala 1520 an de wek Hikumeteka girêdayî begê beganî Amedê derbas dibe. (39) Beğen Çemîşgezek ji koka avakarê Mîrîtiya Pîr Huseyn Beg tên, Pîr, di sala 1515-1534 an de mir, 16 iawên wî hebûn û di nava wan de nakokî derket şûnde, ji Dulqadiran Elî Beg demeke kin derbasî cîhê wî bû. Lê koka wan ji Ebûl Qasim Saltûk Tl an ji sala 1072-1102 an de destpedike. (118'37)

Li Dêrsîm û taybetî jî li Çemîzgezekê di defterên Tahrîr de hejmara nifûs heta sala 1541 an zêde dibe, lê piştî wan salan bi awakî dramatik tê xwarê. (118"29) Ew hejmar kêmbûyîn bê guman bi erişen Osmaniyan re raste rast girêdayiye. Her ku erîş zêde bûn gelê herême tevlî Sefawiyan bû û goçê Aran û Xorasanê kirin. Li ser serhejmarê Prof Unal wiha dinivîse: Li Çemîşgezek gundên girê- dayî nehiya Belde, di sala 1541 an de 100 heb in; lê di sala 1566 an de ew yeka dibe 43 heb, sedema wê em qetî nizanin. Dîsa gundên girêdayî nehiya Gunduz di sala 1518 an de 24, di 1523 an de 25, di 1541 an de 27 û di sala 1566 an de 7 gund hene. (118'29) Beşek ji zenda mezin e bi navê Çemişgezeke îro li Xorasan e û guman nine ku ew wê demê çûne. Gor defterên Tahrîr yen Osmaniyan li Çemişgezeke di sala 1518 an de 6458, di sala 1523 an de 6695, di sala 1541 an de 10.645 û di sala 1566 an de jî 5241 xane şenî hene. (U8 55) Ji wir jî eşkere diyar dibe ku nîvê nişтecîhan ji welat derketiye. Tenê ji vê herêmê 5.404 xane koç kirine ku ew jî texmînî dike 30 hezar kes. Ewên derketibûn çûbûn Xorasanê, min di beşa Xorasan de jî qala zenda bi navê Çemîşgezek û êlên girêdayî wê kiribû. Di wir û di tabloyan wan de jî diyare ku ew ji gelek federasyon/ konfederasyonên cûda pêk hatine. Ew jî Sadî, Germiyanî, Qeremanî û zendên din in.

Pîr Huseyn Beg ji sencaxa Çemîşgezek 1.717.700 akçe pere digirtin ku gor wê deme gelek zêde bû. Sencexeka Osmanî ya klasîk tenê 400 akçe di¬girtin. Ew pere ku Pîr digirtin ji meaşe wezîr jî zêdetir bû. (ns u2) Gor defterên Osmanî ya di sala 1527 an de; heft mîrên Kurd, wek begên Kurd û Kurdistanê têne qal kirin û dema xîtabê wan dibe; "sîz" tê gotin. (ll8l42) Yanî ji wan re rêz tê girtin û wek birêz/mr tê xîtab kirin. Bê guman ew jî ji hêza wan te.

Ew mîrîtiya di sala 1609 an de girêdayî begê beganî Amedê derbas dibe, lê heta sala 1653 an, tê xuyakirin ku hikumetên navendî li Kurdistanê hatine kêm kirin. Dema Çemişgezeke di bin serokatiya Hecî Ristem begê Kurd de bû, Ristem ji alî Osmaniyan ve tê kuştin û mîrîtî derbasî Osmaniyan dibe. Yanî di vê sedsalê de mîrîtiyên Kurd hemû bi xwînê hatine hilweşandin û girêdayî Osmaniyan hatine kirin.!39)

DESTHILATDARÊ KILÎSÊ

(Mendola)

Pîrika min dema li yekî ji malê bi ya wê nedir, bi hêrs diket, ji wan re wiha digot: "Herê ma Mendola di diya ten..!" ew gotina pîrika min heta sed-sala dawî jî bi xwe re anî. Iro em bingeha wê gotinê di mîrîtiya Kilîsê de dibi¬nin.

Gor rîwayetên herî baş û rast, ew pismamên fermanrewavê Hekkarî û Amedê ne. Dibêjin ew sê bira bûne: Şemseddîn, Bahaddîn û Menteşe. Fermanrewayên Hekkarî ji binemala Şemseddîn in ku Şemo jî tê gotin. Ji fermanewayê Amedê yên ji nesla Bahaddîn-Behdîn dibêjin. Ji Fermanrewayê Kilîsê yên ji nesla Menteşe ne jî re "Mend" tê gotin. Mend eskeran kom dike û diçe dikevê bin xizmeta Eyyûbiyan; wan jî, nehiya Quseyre-Antakya danê. Kurdên alî Kilîs û Cum jî ketin bin parêzgeriya wî.<157'250) Bi dîtina min ew beşek yan jî bi temamî ji konfederasyona

Milan bûn û bi piştgiriya Eyyûbiyan êlên dora Kilîsê kirin bin desthilatdariya xwe. Di dema neviyê Mend Qasim Beg de, Siltanên Çerkezan hikumeta Kurd dan destê Şêx Izzeddîn ku Ezîdî bû. (157250) Neslê wî Izzedîn ê piştre wek Oxçî bên xwendin. Ji wir mirov dikare bibêje ku wê demê Reşî yan jî êlên din ên mina Oxçî, Celikî û yên din li wê herêmê û di bin desthilatdariya Mend de bûn. Ji gotina pîrika min jî diyare, ku ew mirovekî hişk û zilimkar bûye, ku gel ew gotina kevn li ser gotine.

Mend, Ezîdiyên li Quseyrê, Hama, Mereşû û bi Kurdên li Cun û Kilîsê ve dijiyan di bin fermandariya xwe de kom kirin. Di dema Memlûk û Selîmê I de, di navbera Şûx Îzzeddîn û malbata Mend de alozî derketin.121041 Mend, Kurdên Ezidî yên li Hama, Mere§ê rabûn raperînê têk bir û bû desthilatdarê herêmê. (8) Li wir jî ew gotina pîrika min rast derdikeve; ne tenê ew, em ter dibin ku Mend êla Bênam a girêdayî Reşiyan jî birêvedibiriye û îhtîmaleke mezine ku ew jî têk biribe. Koma Reşiyan, him ji alî nifûs him jî ji alî mîrîtiyên çekirî ve konfederasyoneka mezin bû. Walîtî û mîrîtiya Meletiyê di destê wan de bû. Milê Reşiyan yê bi navê Bênamî li Kilîsê ji alî Canpolat Beg ve îdare dibû. Yanî kalên Welîd Canpolatê îro bi nav û deng jî girêdayî Reşiyan bûne.

Emîr Huseyn heta Rekkayê hukmê xwe derbas dibû û birayê xwe Emîr Elî Paşa jî emîrê Helebê bû. Dema şeıe Çaldiranê Selîm ji vê malbatê re xeber şand ku ma alikariya leşkerî û xwarinê bid in Osmaniyan. Lê Emîr Huseyn ew bi bahanan derbas kir û qebûl nekir. Bi ser vê de sedrazamê Osmaniyan Sînan Paşa ji vegera îranê di Kilîsê re derbas bû, birêvebirê Kilîsê Emir Huseyn kuşt. Canpolat Elî Paşa gelek bi vê yeke âşiya û li hember Osmaniyan serî hilda, li ser navê xwe pere çap kir û xutbe da xwendinê. Bi İtalya re kete tekîliyê û serxwebûna xwe îlan kir. Sedrazamê dewletê Kûyûcû Murat Paşa bû. Bi Canpolat Elî re ketin şerekî dijwar, lê

Elî fehm kir ku ewê têk here, xwe avête bextê Siltan Ahmetê I an û wî jî ew şand wîlayeta Temaşvar. Kûyû bi vê yekê gelek aciz bû û bi dizîka ew da kuştin (1607).

Gore salnama Osmaniyan a sala 1856 an, li wîlayeta Kilîsê êla Oxçû îz-zeddinlû dijiya û ew eşîreta li Dêrsîm, Kerekoçan û Haymanê heye.

ŞEXAN

Li navenda An a dole, girêdayî navça Polatliyê êlêka bi navê Şexan e heye. Li günden Kirşehîre jî Şexbilan hene, lê herdû ne yek êl e. Şexbila girê¬dayî Reşiyan e; Şöxan serbixwe ne. Li çar gundan belav bûne. Li gelek cîhên din jî ji wê êlê kom hene.

Ew êla hanê di derdora salên 1780 an de ji gundê Ziyarete yê girêdayî Sûrûçê hâtive û êlên girêdayî jî ev in: Serxaşlar, Seelîler, Kalikiler, Aciacilar, Kemalalar in. Wekî din li Sûriyê jî ew hene. Li Anadoliya Navîn jî li gundên bi navên Şâxa Jorîn (Emîrler Kesîkkavak), Ṣêxa Jêrîn (Emîrler Eskî Çaliş), Şâxkan (Buyuk Konakgormez) û Hespîra (K. Konakgormez), Polatli, Bala (gundê Sû- guzel) û gundê Balçikhîsarê (Hecî Pir Oxûllari /Eyyûb Oxûllari) yê girêdayî navça Eskîşehîre Mahmudiyê. Ji vê êlê kesên mîna Necmettîn Cevherî, H. Ibrâhîm Uçak û Mûstafa Kiliç têne nasîn jî derketine.

Şexa Jorîn

Rapora êlên Kürden ji alî dewleta Tirk ve bi mora "pir pir dizî" ji bo bakûrê Kurdistanê hatiye amadekirin de vê agahiyê dide: Şêxan li Hîlwan, Sûrûç, Sîwerek û gundên dorê 7529 kes in; Kurmanc û şafû ne. (:08~33S)

Şâxane li çiyayê Kurmêncê ji Bîrecîkê hatine ku wana bi Amkan ve li rojavayê çiyê rûdinên. (132'16) Li Sûriyê erdê wan di navbera Biyan û Amkan de ye, ji bakûr ve jî Tirkive heye. Derdora 12 hezar kes in û 75

gundên wan hene. Hinek ji wan gundana ev in: Etmana, Mamila, Qermîtlîq, Şêx Bela/Bilo, Be-

lelîko, Şengal...di sala 1852 an de bi Biyan re şer kirin û zora wan birin. (13261)

Seferoglû dibêje: Şihan/Şûxan jî, yek ji çar milên Qerekeçîliyane, îro ke¬tine nava Milan. Qebîlên Şexikan ev in: Hacan, Mûsikan, Kubatan, Sihimam, Kotan, Davaran, Şixkan û Binkaşim in. (91‘71) Ew jî îspateka ku Qerekeçî ne Tirk in û Kürden xas in. Wekî êlên din ên Kurd, Şexikan jî gelek belav bûne, beşek ji wan jî li Xorasan in. Beşek ji wan min ziyaret kirin, mirovên mêrxas, Kurd- perwer û mêvan hêz in.

Şahvedîxane Şâxkan, li herêma Çinaran û Radikan bigire heya Meşhede di bin desthilatdariya vvî de bûn. Nadir Şah ku heman Nadir Quliye, bi xwe ji Kürden Efşaren di herêma Dîzawend û aliye Deregez û Qoçanê ye û diya wî ji Kürden Baçiyan e. Şexkan bi wî re alîkarî kirin û ew bilind kirin. (145',0, Di sala 2001 an de ez çûm Çinaranê û li wir bi şaire hêja Huseyn Şexikî yê ji êla Şexika ve me hevdû dît û hîna jî bi hêst û baweriya Kurd û Kurdistanê ne.

îro di nava Beraziyan de êla Şêxan xuyadike û di nav Kurdên li Lazqiyê yen ku îro asîmîlê bûne de jî êlêka bi navê Şexanî heye ku heman êl e. Mirov dikare bi rihetî bibêje ku ew êlêka girêdayî konfederasyona Berazî ye û Berazî jî bi Reşiyan ve pismamê hev in.

oxçî

Di jêderan (Osmanî) de navê vê êlê wek Okçî derbas dibe. Ok/Ox di zi-manê tirkî de tê wata tîrê. Di demên berê de ji bo ku vê êlê ji artûşa dewleta Os- maniyan re tîr çêdikirine vê re gotine Okçî. Lê di bingeh de navê vê êlê ne ewe. Wekî heta vir jî me car caran îşaret pêkir ku vê komê bi zenda Reyhanli-Celikî ve têkilî û elaqa xwe heye. Em dibînin ew

demeke wek Îzzedînlû, demeke wek Mendola û demeke jî wek Oxçî hatine binav kirin.

Ew koma han, di nava Beraziyan de jî xuya dike. Li Anadola Navîn jî ew di nava Reşiyan de xuya dikin. Gor agahiyên ji defterên tahrîr-nifûsê mane di sedsala XVI an de em Oxçiyan di nava Reşi)£n li Kurdistanê de dibînin. Yanê, 500 salên dawî ew girêdayî Reşiyan e. Lê rastiyek heye ku komên bi navê Reşî, Berazî, Celikî-Reyhanli û Oxçî-Îzzeddînlî bi piranî di nav hev de bûne û hemû li kokekî digehêjin hevûdû. Eger mirov bibêje ew di bin sîwana Şadiyan de bûne di cîhê xwe de ye.

Di sala 287 an de li herêma Bedlîs û Mû§ê rastî ûrîşa birayên bi navê Ma-mik û Konak hatin. Di Oxûznama Dede Korkut de Slag=Oxçi girêdayî Îl-Begê xwe yê bi navê Oxçi Kozan bûn. Canê xwe bi hatina rojavayê Firat re rizgar kirin û ew ji Oxûzên di navbera Meletî û Helebê de dijîne. Ji 24 êlan pêk tên. Okçû-Îzzeddînlî li Kûrûdaxa li Helebê zivistanan derbas dikin. Di belgevên Osmaniyan de wek "Konar-goçer Tirkman Taîfesî" derbas dibin û wek milekî Êla Reyhanli tê ziman. (91_69)

Di dema neviyê Mendê Kilîs, Qasim Beg de, Siltanên Çerkezan hikume- ta Kurd dan destê Şûx Îzzeddîn ku Êzîdî bû. Dema Siltan Selîm, Qasim û kurê

vvî yê 12 salî Canpolat hatin Stenbolê û fermana mîrîtiyê da Şex Îzzeddîn. (157'252) Pişti mirina Şexe kor-ocax (bê zarok), dewletê milkê wê mîrîtiyê li alî Antaqya xist ser milkê Siltaniyê (dewletê) û Hikumeta Kurdan ji Melik Mihemmedê Begê ji binemala Mîrên Heskîfê re berdan.057"252’

Di salên pişti 1700 an de, ji bo gelek êlên Kurd bicîh kirina li Sûriyê destpê kir, Oxçiyan ji ji wê yekê para xwe girtin û wekî Orhonlû ji dibêje: Gelek êl di sala 1711 an de li Hama û Humusê hatibûn bi cîh kirin. Lê ji ber erişen Ereban û şerten cografîk wan nikarîn li wir bijîn û reviyan Kurdistanê. Di sala 1720/1 an de ferman derket ku ew dîsa vegerin. Ew êlana wiha rêz

di- bûn: Harbende, Sîlsupur, Cerîd, Tacir Koçeklîsî, Inal, Mûsaca, Oxçû Îzzeddîn û yên girêdayî wan Recep Avşari, Kiliçli Kurdu. Yen girêdayî Dulqadir, Avşar, Anterî, Omerî, Kizik, Yap-altûnê girêdayî Cerîd, Koyûnoglû û Canbegan bûn. Gor fermana di 1720 an de kesek nehate deşta Havran. Pa§ê gotin ma werin keviya çemê Belîhê. Di kontrola sala 1733 an de hate ditin ku gelek ji wan li der doran belav bûne. Dîsa jî hewldan ku kom bikini90'96’

Oxçî Izzeddiniyên ku li Çiyayê Kurmenc dijîn, paşe bi Kurdên Kefer- dûzê ve tevhev li Keferdûzê navçeka din çêkirin û nav danê Izzeddin. Elên girêdayî ev in:

C. Turkay jî dibêje êlên Oxçiyan ev in: Kel, Kosebekir, Şâx, Velîoglû, Di sim, Mûsabex, Oksuz; civatên xwe jî ev in: Anit, Corikan (cerikan), Disim, Kosebekir. (160) Dîsa heman nivîskar ji bo Reyhanlı jî van agahiyan dide: Lia Reyhanli ji van beran pêk tê: Saricaî, Qereahmetî, Tokali, Bahadirî, Kabaklarci, Tonî (Donlû), Kuralî, Sala û Okçû ne. Ji wan Okçû ji Helebê bigre heta Sîs, Edene, Entep, Mereş, Biga, Kîxî, Rakka, Birecik, Ordû, Antakya, Ay din, Fîlîbe, Nîxdeyê belav dibin. Okçû ïzzeddînî ji êla Killi (dive Keller be) ne û di heman herêmên li jor rûdinên. Oxcûyan jî girêdayî Reşiyan in. Li Semsûr û Meletî dijîn.'160'611’ Ela bi navê Orûçgazî Cerîdî girêdayî êla Külü ye û li Mereşe rû¬dinên. (16ü'615) Ela Kiilû hertim bi Cerîd, Reyhanli û Celîkivan ve tevhev derbas dibe û tê heman watê. Gor rapora êlên Kurdên ji alî dewleta Tirk vê bi mora "pir pir dizî" hatî amedekirin de jî dibêje: Li Kîxiyê 1200 kesên ji Oxçiyan dijîn, henefî û kurmanc in. Piranî li Qereqoçanê-Depê rûdinên.008'76’ Li Navenda Anadolê û li navça Çîçekdaxi-Kirgehîrê gundên Oxçiyan ev in: Alan, Şorik, Bozlarevî, Golcuk, Konir, Avanoglû û Çokelîk.

M. E. Zekî jî wekî me got di nava Ber azan de nîşan dide û dibêje: navê wan Berazî (Biraziye) ne, li aliyê Sûrûcê dijîn û 9000 hezar malbat in. Ji 11 qêbîlan pêk tên. Di nava wan de yek jî Oxçiyan e.09)

BERAZÎ

Li ser vê êl an jî zendê Şerefxan agahiyên giranbiha dide: Li saltanata Emewiyan, di destpêka sala 744 an de hevsarê rêvebiriyê kete destê Merwanê Kerr. Piştî pêne salan, Ebûl Ebbas El Seffah li dijî wî seri h il da û bi ser ket. Mer- wan berbi Misirê ve bazda lê ketin dû û di 750 an de ew kuştin. Merwanî ji ber zexta Ebbasiyan belav bûn, sê lawên Merwan û meriyên vvî Filistin terk kirin û hatin Qulpê û li nehiya Xezeliyê bi cîh bûn. Ela Banûkî jî li dora wan kom bû, evv xurttir bûn û heta Çemê Amedê kete destê wan. Ew xismên wan yen li Misir û Şame jî hatin û di dawiyê de ev tayîfa han bûn heşt grûbên bingehîn: Banûkî, Hewêdî, Dilxêran, Bociyan, Zîlan, Besyan, Zikziyan û Berazan. Hinek ji wan şafiî ne, hinek jî Ezîdî ne. Nêzîkî 100 kom û şaxen ji wê zendê koçer in. Ji Merwan, Mîr Îzzeddîn û Mîr Celaleddîn ma. (I57'2#tl Ew êlên Kurdên bi navê Misirî, Şamî gereg wê demê hatibin û ji wan êlên li jor yek e.

y '

Seroke Berazan-Şahın

Behlûl Begê neviyê Îzzeddîn ji dewleta Osmanî re pir xizmet kir, ji bo wê Meyafarqîn ji Qulpê veqetandin û dan destê Behlûl Beg. Baca êlên Besyan, Bociyan û Zîlan jî ji alî Behlûl ve tên berhevkirin. Di seferên Iranê de li gel ge- lek zilim hatin kirin û ji ber wê êla Silêmanî ji warê xwe barkirin û çûn cihê ji Qizilbaşan vala bû yî. Bi ser wê de xwestin, ku hevsarê êlan ji Behlûl bê stendin, lê êlan serî hildan û bac nedan. Bi ser vê de ji alî Mehmet Paşaye mîrêmîran ê Amedê ve fermana ji holê rakirina êlên Besyan û Bociyan hate dayîn. (157 292)Di beşa Sewêdiyan

de jî me qal kir ku ew êla wek Silêmanî jî tê nasîn. Besyan û Boçiyan jî îro li Xorasanê dijîn.

Li ser beşekî Berazî em fermaneka balkeş dibînin: Ji Qadiyê Riha û Rakkayê re! Tu ku mîrêmîran î û ji min re name dişînî ku civatên Kor Xizir,

Qere Yaxmûr, ji civata Berazî Silêman li Qerekeçiyan digihîjin hev, li gundê

Hanifî û derbendê wir; eskerên ji wazîfê tên û diçin Rûm û Helebê dikujine û erzakan wan talan dikine...sala 1019-1606. (161"62)Ji wir em fêr dibin ku wê demê Berazî li dora Rihayê ne; ku li wir herêmeka bi vî navî jî heye. Dema kalê min digot em ji Berêz ha tine, me nedizanî ku li dora Rihayê cîhekî bi vî navî heye. Ya din jî ew êrîçê gundên henefî dikirine ku tê wê watê ew yan Sersor yan jî Ezîdî bûne. Bi Qerekeçiyan ve jî têkiliya wan baş bûye.

M. E. Zekî diyar dike ku ew li dora Sûrûcê cîijîn; 9.000 malbat in û beşek

Li Qereyazi-Erzirûm û Tûtak a Agiriyê 5500 Berazî hene ku ew şafû û Kurmanc in. (108’121) Li bajarê Lazqiyê jî: Şbxan, Mûşan, Clean (Qoçan), Mamilî, Zirikan, Abdeliyê hene ku ew di salên 1620-1650 de çûne.

Gor Z. Gokalp Li Sûrûç, Mûsil û Kerkûkê dijin û §axên xwe ev in. (104 27)

Abîdîna Keykanli (Kîkan) Bicanli Dinayî

Dîdanli Şedadî Sîncanli

Li keviya Kizilirmak gundekî bi navê Emera heye rojavayê xwe Damla-cike, başûre xwe Şereflîkoçhîsare ku gundekî girêdayî Bala-Enqere ye. Gundên din ên Kurd jî Hirfanli, Kekîlîalo, Ekîzler (Gêra) jî girêdayê Kamanê ne ku giştik ji êla Pisiyan in û hemû xismên hev in. Di nava Beraziyan de Pijan, Pican hene, bi dîtina min ew Pisiyan jî ji wan e.

Serokên Kêtikan Besrawî

Gor dîtina hinek nivîskarên din jî Berazî wiha belav dibin: Li Sûriyê 20 hezar xane Berazî hene. Beiên xwe: Alaettîna, Pican, Dinan, Ketkan, Şeddad û Seyhanli ne. (108'367) Di qeydan de Gundê Beraz ii di sala 1547 an de li Kolikê 7 xane û kesekî bê mal derbas dibe. Di sala 1560 an de ew bû 9/2dIÜ9 61> Berazî- Burazî jî berê xwe ev in: Aladdin-Sarkinti, Beyhan, Asiyan, Doktîkan, Dida, Dodan, Ohyan, Ohyanûsiyan, Şexan, Şeddad, Şeddadfer, Zarvar in. (16û) Gor lêkolînên min kirî jî îr o li Sûriyê ew êlên Berazî ye hene: Akûzan, Eledînan, Eiîzeran, Ebereşikan, Meafan, Mîran, Istîkan, Kêtikan (serokê xwe Besrawî ye û beren xwe ev in: Qerîşan, Pirçan, Qeremdaliyan, Tarpûşan, Sîciklî), Oxan, Pîjan, Reşwan, Zirîkan, Şexan, Şedadan, Mûsikan, Zirvalan e.

Li bajarê Qobanê jî belavbûna wan wiha xuya dike: Berezan (serokê xwe Bozan Beg) Mîran, Meaf, Alêdînan, Zîrwar, Pîjan û Şexan. Kêtikan jî wîha ne: Qerîş, Qeremdalî, Beşaltî ne. Ox û Şeddadan jî wiha ne: Ox, Şeddad, Asî,

Elîzer, Zoncikan ne. Wekî tê xuyakirin navên balkeş di navê de hene. Wekî Istîkan, ku navê Iskîtan tîne bîra mirov û ne dure ku ji wir jî tê... Dîsa Sicîklî, nêzî navê Sincika Xorasanê û îhtîmaleka nêzîke ku heman êl in. Reşî, Zerikan, Şêxan, Şadı û Mûsikan jî li AnatoHya Navîn û lier cîhê din hene; ew jî dide xuyakirin ku ew êlêna çiqas nêzîk ketine nava hev...

DIMILÎ/KE -KURDASÎ

(Erkeciga-Hilkecik)

Li navenda Anadolê, bajarê Aksarayê Kurdên bi zaravê Kirmanckî di-axifin jî dijîn. Li vî bajarî ji bo KirmanoDimilî-Zaza navên mina Canî, ji zimanê xwe re jî dibêjin Kurdasî û Dimilîke; ji bo Kurmancên li wir jî navê Qilorî- Qilêrî bi kar tê. Qilêrî wekî berê jî min nivisî ew ji êla Sewêdî tê. Gor baweriya Sewêdiya ji ber bacê fîlîkên bizinan yê didane dewletê û

wan jî di wata kesên fîlîk dide de bi tirkî "Qil veren" gotine û nivîsîne. Lê di bingeh de, ti êlên bi vî navî jî nînin. Nivîskar û lêkolînêrê herêmî bîrêz Meme Hilkecikî dibêje: Li Aksarayê navê Ekecik bi navê Kurd ve di heman watê de bi kar tê û nêzîkî 50 hezar Kurd li wir dijîn (Yavrûvatan Hilkecik Kürtlerînîn Serüvenî)."

Gundê Kelebalta - Aksaray/ Foto: Omer Yüce

M. Hilkecikî: Ewr Kürdana herî kêm 300 sal in hatine Aksarayê. Giştik dibêjin em ji Amedê hatine, lê ewên nezan û bi piranî jî kal û pîrên xwendin û nivîsandina wan nine dibêjin em ji "Asya Navîn" hatine. Ew gotina nîşana propaganda nijadperestî ya di nav gel de cîh digre nîşan didin, dibêje. Lê heta vir min di gelek beşan de da xuyakirin ku Kurdên Kirmanckî axif jî ji navenda Xorasanê hatine. Ji bo wê gotina mezinên nêzan bi tevahî ne şaş e, berovajî wê raste; lewra ew ji kalên xwe bi zarkî/devkî fêrbûn ku ew ji Asya Navîn hatine û me heta vir hewl da ku wê îspat bikin. Dîtina din ê ji Amedê hatî jî raste; lewra ew êlêna ji Xorasanê hatin bakûrê Kurdistanê bi şûnde li Amedê bi cîh bûn û ji wir jî hatin şandinî Anadola Navîn.

Piştî batina Tirkan ya berbi rojava û hilvveşandina dewleta Şadî ya Kurd, em şopa Kürden Kirmanckî axêf peyda nakin. Ew jî ji nav guhartina Osmaniyan tê; ji bo ku navê hemû êlên Kurdan guhartine, ji bo peydakirina wan gelek zahmeti derdikevin. Yek ji êlên heri zahmet ji bo derdikevin jî ew beşa Kurdan e. Lê piştî sedsala XV an êdî mirov dikare şopa wan bibîne. Wekî birêz Alakom dibêje:

Piştî zeptkirina Stenbolê, 1453, Kurd ji Aksarayê hatin ajotin wî bajarî û navça Aksaraya li Stenbolê damezirandin. Di wê demê de, di 1469 an de jî gundên Kurdan li Anadolê hebûn. Di dema Fatîh de jî gundekî bi navê

Kurtler li Aksarayê hebûn. Dîsa di wê serdemê de navê mezreyeka bi navê Danişmendlû derbas dibe û ew gundê Kurtler jî di tapoya wî de ye. (U'KW| Bi texmîna min ew êla han di jêderan de bi piranî wek "...Kurd..." hatiye bi nav kirin. Di nava êlên Tirkmenên Helebê û Boz Ulûs de jî êlên bi vî navî hene. Birêz Hilkecikî dîroka êla xwe heta Qeremaniyan jî dibe. Texmîna min ew mumkune; lewra di nava Qeremaniyan de şopa wan tê texmîn kirin. Ew êlên wek Kurd tên xwendin jî bi piranî bi Qeremaniyan ve ne.

Gundiya li Aksaraye-Tirşik / Foto:Omer Yucc

Em dikarin dîroka Kurdên li wir heta Qeremaniyan bibin. Du delîlên wê hene: Yek, Şikarî yê dîroka Qereman Oxûllari nivîsî di rûpela 132 an de di¬bêje: Alaeddîn Begê Qereman ji Kurd, Tirkman, Moxol û Qeremanan 42 hezar esker kom kir û şand ser dizên li Kela Sivrîhîsarê. Ya din; Fatîh di sala 1469 an de Aksaray ji Qereman Oxûllari stend û tevlî Osmaniyan kir. Ji wan navên çend gundên Kurd jî derbas dibe, îro jî ew gundana hene û berê jî ew di destê Qeremaniyan de bûn. Di deftera "Deftera Fatîh" a ku di saial476 an de hatiye

nivîsîn û niha ii Enqerê ye de navê gundê Kurd Şexan derbas dibe. Di destê Qere Şamaze ji gundê Çavdarli de berata (tapoya) ji Fatih de mayı hebûye û di wê de bi cîh kirina Kurdan ya li Aksarayê dihatİye nivîsîn, lê sala 1970 ji Sten- bolê du kes tên û wê dibin. Di devvra Beyazîtê II an de û di deftera 565 an qey- dên qedîm de, weqfên di 1500/1 yen li Qereman û Qeyserî û Içelê de gundên jor û gundê Borûcû jî derbas dibe. Di dema Yawûz de û di deftara hejmara 40 an de (Istanbul-Başbakanlik Arşîvî) jî navê çar gundên din ên Kurdan derbas dibe. Vana: Gundê Kale, Alayî, Saxir Qaraca û Gelesûn in. Di dema Kanûnî de jî ew berdewam dike. Di dema Muratê III an de jî ew gund derbas dibin: Ekecîk, Agin, Çavdarli-

Çavşîr, Tepesîdelîk, Saxir Qaraca, Qerekûyû, Gundê Mîr, Kurdler... (M. Hilkecikî).

Şemsettin Samî di sala 1306 an hicrî de, di "Kamûs-ul Alam" de dibêje: Aksarayê heft bûcaxên xwe hene û ji wana Kurd-lû û Ekecîk jî dinivîse û di¬bêje hinek ji gelê wan bûcaxan Kurd in û ji êlan in.

Cemeeta Seyfler a li Aksarayê nîştecîh, di sala 1779 an de serî li dewletê da, ku bibin derbendvan û daxwaza wan hate qebul kirin. Di sala 1796 an de ji êla Melikli Bayadi jî hinek wek derbendvan hatin bicîh kirin. (l5<l lO0) Îhtîmaleke ku Seyfler Sewêdî bin.

Du kal û pîrên ji Aksarayê / Foto:Omer Yuce

Gorî salnama Osmaniyan di sala 1856 an de, ii Liva-i Qonya êlên bi navê Kureyş Divle û Kureyş Ozu derbas dibin. Fia Kureso ya ku li Dêrsîmê

dijî, dibêjin em ji Qonyayê hatine. Ev êla jî bi erîşân Tataran yen li hemberî Xorasanê, ji wir koç kirine û hatine Mêrdînê. Ji wir jî derbasî alî Qonyayê û ji wir jî derbasî Dêrsîmê bûn û beşek jî bi navê Xido Sur derbasî Semsûrê bûn. (39) Mumkune ku ew Dimiliyên li Aksarayê ji binemala Kureso bin. Lewra aga- hiyên birêz Kocadax dide jî wê bi hêztir dike. Kureyşan ji Xorasan hatine, li Dêrsîmê belav bûne. Ew ji êlekê zêdetir dergahek e û êlên din ji nava wan derketine û dedên xwe navdar in. Alî Kemalî wan wiha beş dike: Huseynan, Gulnan, Kalyan, Valyan, Aliyan, Heman, Silêmaniyan, Çitan, Gudan, Seykan, Gaziyan.,17'220) C. Turkav jî agahiyeka cûda dide: Saranli li Palû û Aksarayê dijîn û ew ji taîfe Ekrad in.<I60'M7) Ew jî Saranli nav dike û bi yên Palûyê ve girêdide. Li Palûyê jî piranî Dimilî dijîn lê çiqas têkiliya wan heye nayê zanîn. Sakaoglû jî dibêje ew li dora Sêwasê bûne. Derwûş Axa dibêje: "Elên wek Canbeg, Kanli û Zaza 40-50 sal in li vir (eyelata Sêwasê) xwedî milk in û çavên wan ne li

firarê ye; ez garantiya wê didim" dema dibêje sal dora 1848 in. (l291S2) Yanê, 1800 an de ew êla Dimilî li Sêwasê bûye. Mumkune ku ew êla Kurmanckî axêf jî herdem li cîhêkî nîştecîh nema. Ji ber erîşûn cûrbecûr, ew jî cîh guhartin.

Gundên li Aksarayê yên Dimilîaxêf ev in: Alaxûn (Alayhan), Borûci, Porneka Mezin û ya Biçûk (Porink), Cûnqilî (Cangilli), Çalê Bekirî, Çekkûr (Çekîçler), Ekecîkgodeler, Kullan (Qereçayir), Ekecîkotû, Ekecîkyenikoy (Navê gundê yekemîn Melê Sûr e, pa§ê bûyê Yanko), Qereqû (Qerekûyû), Qoyax (Koyak), Canan (Salmanli)

Salmanli / FotoiOmer Yuce

Şâxler, Taptix, Kurdalî (Yanyûrt) in. Wekî xuya dike di nav gundên Dimilîaxêf de gundê bi navê Pornekê derbas dibe. Me li pê§ dîtibû ku ew Por- nek yek ji êlên Pezgewr avakirine ye. Ew xaleka gelek girînge û pêwîste hîn zêde bê lêkolîn kirin û bi zelalî derkeve holê. Di gelek jêderên Osmanî de jî

vvek Texteciyan derbas dibin. Birez Ömer Yüce li ser günden Erkeciga gelek

lekolın kiriye û gor ew dini vise, kesên ewan gundan piranî ji Amed, Dêrsîm û

Çewlike hatine.

Jı bo dıroka günde Alayhan Omer Yüce vvıha radigihıne: Firen günde

me digotin kale me ji Tetwane hatine Amede. Li wir, we deme suren Amede

tamir dibûne û ji wan jî baca şîr û hiri-fîlikê xwestine ku baceka giran bûye.

Ji ber we bacê ew terin Rume. Li Aksarayê saleke dijîn lê

herêma çivaye Ekecîka Mezin û li dora günden Çavdarlilar u Gokkaya bicîh

dibin. Beğen ele li günde Alayhanê bi cîh dibin. Ji kesên dihatine perê xanê

dıstendine, Paşe jı rojhilat ve ela Qilveren (-Sewedi) te u dibejin ku ew gunda

ji wan re hatıye dayin u di deste wan de belge-fermane heye. Le ti caran ew

nişan nedane. Ew bi xwe begen xwe hildibijartine.. Ci deme hatine em niza

run, Ihtimalek ku dema Fatih Aksaray girt u gele wir şande Stenbole bi şunde

hatibin.

Rafet / Foto:Omer Yüce

Günden li Aksaraye Kurmancı axêf jı ev in: Axîn, Alayî, Doqan, Bewek,

Camı, Çiwderli, Şeyda Jer, Duxuz, Sîdûn-Siwidûn, Qilori, Qerememet, Qele

Qeleko, Xiyrat, Porneke Biçûk, Çavdirli va Biçuk, Macirkoy, Macarli, Qişla Sor,

Reşadiye, Cerran, Qullor-Saraxil, Susadı, Depesdelîk, Yalnicevîz in. Kürden

Zozanên Filikçi û Yalnizcevıze ıro heliyane û ciwanên wan kürdi nİzanin.

MÛSKAN

I.i navenda Anadolê gundekî bi navê Mûsikan/Mûskan ê nêzîkî bajaro-ka Polatli û Haymanayê ye heye; gundî dibêjin em Mûsikî ne, lê li ser wê

êlê yan jî navî tiştekî nizanin. Hinek ji gundiyan dibêjin em Canbegî, hinek jî di¬bêjin em Têrikî ne; di nava gundiyan de malbatên ji wan êl-koman hinek hene, lê Muskan jî heye ku kes tiştekî li ser nizane. Gundî ji alî axaftinê ve nêzîkî Canbegan e, lê ji alî fizikî ve jî nêzîkî Mirdêsî û Sewêdan e.

Yeşîlgoz dibêje: Ji bo wan tê gotin ku ji Efi yan vir ve ew dijine, ji hilweşandina Hîtîtan (BÎ-1200) wir ve begligên hatin damezirandin yek jî Muskan e. (34) Eger ew îddea rast be, wê demê Mûskan binemalên Mûşka yên mora xwe li dîrokê xistin e. Me qala wan kiribû. Ji alî din ve di nava zenda Berazî de êlêka bi navê Mûsikan heye; îhtîmaleka pir mezine ku ew gunda ji ali kesên ji êla Berazî ve hatiye damezirandin. Malbatên din jî, dûre tevlî wan bûn. Cîh û pêvajoya zenda Berazî tê re derbasbûyî, ew êlên li Anadola Navîn jî derbas bûn û ji bo wê Berazîbûna wan ne tiştekî ecêb e. Bi vê re giiêdayî dîtina birêz Yeşîlgoz jî di cîh de ye. Şopa zenda Berazî diçe dîrokeka gelek kevn. Bi vê rêve mirov dikare îddea bike, ku Mûşkiyen bi nav û deng dibe ku kalên Berazî bin. Bê guman gereg hîn zêde bê lêkolîn kirin.

Gorî belgeyên Osmaniyan, cîhên Musîkan: Erxanî û Rakka ye û wek " Ekrad Taîfesî" tên nişandan. Balekan û Amînane (Yekê jî Cereban e û yek jî ji Têrikan e ku paşê jê veqetiya) giiêdayî Qerekeçîliyan jî qebîleka xwe bi navê Musîkan heye. (91'69) Îhtîmaleke ku Bilikên ku îro li Anadolê dijîn jî berekî ji Qe-rekeçîliyan bûn...

Di gelek jêderên kevn de ew êla hanê, girêdayî Zerikiyan jî xuya dike ku di beşa Zerikiyan de emê li ser rawestin.

ZERIKÎ

Li ser navê vê komê gelek rîwayetên cûda hene; lê navekî kurdî ye û ji rengê zer derketiye. Zeri-kî, wekî kesê zer dikeve bîra mirov; îhtîmaleka

mezine kesên ji vê êlê gelek kej in û ji bo wê jî bi wata kesên zer ew nava li ser maye. Lewra di nav vê êlê de kesên zer û çavşîn pir in û dema mirov wan bibîne nizane ku ew Kurd in. Bi taybet beşekî pir bejn dirêj, kej û çav şîn di navê de ne ku mirov matmayî dimine... Seferoglû vê dîtinê tesdîq dike: Di deftera Osmaniyan a Tahrîr de wek "Konar-Goçer Ekrad Taîfesî" derbas dibe. Wata nav zerine; ku di tirkiya kevn de "Sarig" derbas dibû. (9,'72> Zeriya kurdî wergerandine tirkî û kirine sarig. Di nav jêderên Osmanî û tirkî de, navê vê êlê bi 24 awayên cûda hatiye nivîsîn. Wek mînak: Zeriqî, Zerikanlû, Zirokan, Zerniqî, Zerdiqan, Zediqî, Zorkan û hwd.<182‘43) Gor vê yekê jî şansa wan heye ku orîjînala peyvê zêde nehatiye xirab kirin. Wekî din jî vê komê li cîhê mayî navê xwe hîştiye. Lêkolînerê ji heman komê Y. Zerikî dibêje: Li cîhê ku êla

me Zerikî nîştecîh bûye, dareka tûyan hebûye û vê re digotina "Tûya Zer" û ji bo wê ji wir re gotine Zerik. Li bakûrê Sûriyê cîhekî bi navê Zerqan heye, ji Dêrîka Merdine re bere digotin Zerik, li Merdine ava Zerqan û nehiya Zeriqan ji heye, berê girêdayî Amedê paşejî girêdayî Wanê Lîwayî Zerqîhebû, herêma di navbera Lîcê-Hezro-Hîzan-Mînar-Sêrt-Erûhê re wek Zeriqan derbas dibe. Disa gor xerîtên ji sala 1100 mane de, herêmeka firêh bi navê Zraq heye.{182'45)

Dîroknûsê Kurd Şerefxan li ser kok û navê Zerikiyan dibêje: neseba wan digihijê Erebên Şame û ji çar şaxan (Derzini, Girdikan, Ataqê-Lîcê, Tercîl) pêk tên. Tê gotin; ku yekê navê vvî Şâx Hesenê kurê Seyid Ebdurrehman şert û şirûten zemanê ew mecbûr kirin ku welatê xwe yê xêr û bereket terk bike û bê welatê Mêrdînê. Şex Hesen, li wir bidh bû, dest bi îbadetê kir, ji bo ku her wextê kincên hâşin li xwe dikir, di nav gel de bi navê "Şâxe Ezraqi" hat naskirin. Belki ji çavhâşîn bû û ji ber vê ew nav le hatibû kirin. Çêx li Merdin gelek kes li dora xwe komkir û Siltanê demê je tirsi; lê paşe bi xwe ji bû mirîdê wî û keça xwe lê mehr kir. (157'2®) Şerefxan ji şaşitiya

nûserên din dike; ihtimale ku ew di bandora yên din de ji maye, lê rastî ewe ku ti têkiliya Zerikiyan û Ereban ve nine. Ew ji wek êlên din ên îro li dervayê welat ji navenda Xorasanê hatine. Pirsgirêk ewe ku em tam nikarin tespit bikin, ku dema cara yekemin ew hatin li ku bi cîh bûne. Îhtîmaleka pir mezine ku ew li bakûrê Sûriyê yan ji li dora Şame bi cîh bûn. Ya heri zêde nezikî rastiyê ji ewe; ku ew di navbera wan henêman de zivistan û havin derbas dikirin. Ew §axê vê koma li Lazqiyê ji divê binemala wan bin. Heta tê gotin ku malbata Hafiz-Beşar Esat a li seroka-tiya Sûriyê dike ji Kurd in û ne dûre ku Zerikî bin. Nivîskar Ebdul Ezîz Orner

H. Mûsa radigihîne ku li çiyayê Elewiyan (Lazqiyê) êlên weke Abadli, Koçan, Zirikan (ew di dema Selheddîn de çûne-1320-1350), Şâxanî, Mamie, Mûşan. Ji bili Zirikan, yên din di dema Selîmê I an de çûne.

Li ser dîroka Zerikiyan Hoko dibêje: Zerikî di dema kevn de li Merdin, Mûsil û li Zaxrosan jiyane; dibe ku ew jî tevî koma ji Xorasan hatine başûre Kurdistanê bûn. Gor gotina "Um el Iber", ew li Sîncar, Amed, Merdin û Nisêbînê hikumet ava kirine. Lien girêdayî \ê komê jî wiha xuya dikirin: Aştiyan-Aşûtan, Mİhraniyan, Bexosiyan, Beciniyan, Şeqakiyan-Şikakiyan, Estorkiyan, Gurdiliyan, Aşaniyan-Eyşaniyan, Kişkiyan, Çêlkiyan, Xende-qi-yan-Xan Baqiyan, Suhaniyan, Mehmûdiyan, Keşaxiyan-Kaşaxiyan, Mûsiyan, Serbariyan-Sarbariyan in. Çêlkiyan bi Celikiyan ve têkiliya xwe heye yan na em nizanin; lê Mûsiyan di nava wê komê de jî xuya dikin. Ev êlêna di sala 9Ü0 an de di bin hikumeta xwe de dijîn. Mehmûdî di nava wan êlan de hevkariyê pêk tînin. Ji beiê ve Mehmûdiyan bajarê Mûsil di destê xwe de digirtin. Ji tirsa hêza wan, xelîfê Ebbasiyan nikarîn tiştekî bikin û bi leşkerekî pir erîşî wan kirin. Mehmûdî ji welat veqetîn çûn Wan, Erdîş, Ware Berana (Mûş, Xinis, Me- lazgir, Xelat, Motikan) hildane desten xwe. Serok Bad di sala 950 an de Erdîşe, di sala 984 an de jî Amîd-Amed, Mêrdîn û Farqînê dike din desthilatdariya xwe. Di sala 1282 an de

serok Fîrozşahe Ziriqî giliyê hozên bi navê Zaferanî yê bi Eyyûbiyan kiriye; fermanrewanê Eyyûbiyan li Xerpûtê dijiyan. Ji vê jî xuya dike ku vê serdemê ew komana hîna tevhev nebûne; ewê piştre tevhev bibin û herin Xorasanê.

Nafî'î kurê Ezraqî henefî, ku Ebû Raşîdiyan jî je re digotin, ji Xarîciyan bû û mezhebek nû danî. Di destpêkê de bawermendên wê mezhebe kêm bûn. Fişt re wisan lê hat, li Ehwaz û gelek cîhên îranê piştgir jê re çêbûn. Li ser fer¬mana Ebdullahê kurê Zubeyrê Gizîrê Besrayê, Ebdullahê kurê Fiers Xuza'î li dijî wî rabû û li ber şikest; çend carên din hatin ser lê pê nikaribûn. Di dawiyê de Muhellebê kurê Ebû Sofre yê mîrê Xorasanê ew belav kirin. Nafî'î bi cînişîne wî ve kuştin û dest li ser wan ranekirin. Heta dema Ebdûlmelîkê kurê Merwan û Heccacê Gizîrê Iraqê jî her li dijî wan disekinin. Ezreqiyan Qeterê kurê Fucae kirin serokê xwe û piştre di nav wan de dubendî çêbû. Ebdurba Mezin, bi 7000 û Ebdurba Biçûk bi 4000 kesan cihê xwe terk kirin û berê xwe dan Kirman û Qeterê û di nav farisan de man û Muhalleb zora wî bir û ew jî ber bi Kirmanê ve çû. -C. Rojbiyanî. (15749S) Di wir de tiştê balkeş yek ewe; ku leqaba serokê Ze¬rikiyan Raşîdiyan bûye ku nêzîkî Reşiya ye. Ya din tarîx nine.

Farûk Sumer jî dibêje: Di sala 1185 an de gelek Tirkmen hatin rojhilat û başûre rojhilatê Anadolê; ew li Riha, Mûsil û Rakkayê zivistan derbas di¬kirin. Ji nişkeva derketina wan nîşan dide ku ew ji Xorasanê hatine.113I159) Lê heman nivîskar di rûpela 127 an de dibêje komek di sala 1048 an de hate Iraqê. Yanê hatina wan ne ji nişkava ye, bi hatina Tirkan re ew bûn du şax û yek ji wan hate başûre Kurdistanê û ji wir jî hatin bakûre Sûriyê. Yen ku hatin dora Sûrivê, zivistanan jî diçûn dora Serhedê ku beşek ji wan Zerikî bûn. Sumer wiha berdewam dike: Ji Harîzm Şahan Siltan Şah, Seraks a di dawî de di destê Oxûzan de mayî jî

stendibû û Oxûz bela bûbûn. Li ser wan Ristem Beg hebû. Di navbera wan û Ekrad an de jî şer derket û Tirkmen bi serketin. Tirkmenên

Ristem dema diçûn zozanan erîşî Gurdyan dikirin. Beşekı mezin ji wana ketin bin desthilatdariya lawê Kiliç Arslan, Kudbettîn Melîk-şah ku waliyê Sêwasê £z bawernakim ku evv Zerikiyênîro li Sêwasê dijîn ji wê demê mabin; pişti vê bicîh bûnê jî gelek koçberî û hatin pêk hatin.

Zerikî, li destpêka dîroka Beraniyan yek ji zenda alîkariyê didaye wan bû; piştre Beranî lewaz bûn û Hesenê Dirêjê Pezgewran bi zewacê xwest Zerikiyan bikşîne aliyê xwe, lê dîsa jî bi serneket. Dema Huseyn Beg bû serokê Beraniyan, ji Mûşe (Zevzen) veqetî û çû Bi§êriyê. Ji mîrên Kurd bi taybetî jî yê Heskîfê Melîk Adil û yên din bac, xelata mîrîtiyê xwest lê negirt û kesek nihat erda w'î ku wî pîroz bike. Bi ser vê de Melîk Beg dizanî ku Huseyn beg ê tola vê heyne û dest bi amadekariyan kir. Ji Kurdan esker komkir. Di nava wan de de- sthilatdarê Bediîse Ziya ud-dîn, birayê wî û hakime Mûşe Şemseddîn û begê Farqînê Zirkî Şex Îzzeddîn B. Şex Zeydo jî hebû. Di sala 1349 an de nêzîkî Batmanê şer derket û Melîk Adîl têk çû û dîl ket.lll0 39) Di dema Beraniyan de tişte balkeş êlên îro li dervayê welat bi Beraniyan re dikevin tevgerê ye; bi tay¬betî yên hîna misilmantî qebûl nekiribûn. Bayram Xoce yê Beranî di sala 1371 an de Mûsil dorpêç kir; di wê hewddanê de eskerên Heskîfê jî hatibûn alika- riyê. Ji Xoce bigre, hetanî dawiyê emîrên Heskîf, Cizîr, Bedlîs, Zirkî, Silêmanî û Kurdên din, bi Beraniyan re girêdayî man. (110'421 Qere Yûsûfê Beranî ji Sûriyê bi 1000 leşkerî vegerî Nisêbînê. Li wir rêvebirê Mêrdînê, hakimê Cizirê, êlên Silêmanî û Zirkî tevlî bûn şûnde, di navbera Mêrdîn û Heskîfê de li herêma Taki bi Pezgewran re, Qere Yûlûk Osman re şer kirin, lê ti encam jê derneket û aştî kirin.“10-68»

Wekî Yûsûf Zerikî jî radigihîne: Zerikî wek mîrîtiya serbixwe di sala 1100 de derket holê; heta salên 1520 an bi Pezgewran û Artûqiyan re şer kir û

wê demê girêdayî eyeleta Wanê bû û serokê xwe Mehmet Beg bû.“82"46» E. Xe- mgîn dibêje: Şex Hesen li dora Mêrdînê pesna ola xwe dida. Rêvebirê herêmî ew girt, gel jî nerazîbûna xwe nîşan da, e w azad bû. Di heman demê de rêvebir mir û gel jî ew wek serok hilbijart. Lawê xwe Habîl wrek beg şande Derzînê. Law û keça Habîl ketin revvşeka xirav û kurê xwe şandin herêma Girdikan û begên Girdikan ji wê kokî ne. Begên Atakê (Lîcê) jî ji Zerikiyan in û begê xwe yê yekemîn Ahmed bege. Terdi (Hezro) jî gelê Zerikî ye. Hesenê Dirêj, Omerê Zerikî ji Bedlîsê re kire walî. (lül'188) Hesenê Dirêj dixwest welatê xwe berbi rojhilat fireh bike û bi Beraniyan re cara dawî şerekî bike. Lê pêwîst bû, berê Kurdên di navbera wan de bike bin fermana xwe. Hakîmê Tercil û Atakê yê Kurd Omerê kurê Huseyn Beg pir girêdayî Hesen bû. Weqas ku erdê xwe û keça xwe da Hesen. Lawê Hesen ê yekemîn Zeynel ji wê jinikê bû. (138'419)Siyase- ta Hesen li destpêkê, ji dagirkirinê pirtir lihevhatin bû. Paşû bi riya zewaca bi keçên Bûldûkanî (Têrikî/Mirdêsî) û Zerikiyan re xwest van bi xwe re girêbide, lê vê yekê aştiyeka mayînde û îstîkrar nanî. Wek Zarakî, di tekoşîna nav biran de, cend caran li hember Hesen derket lê di sala 1460 an de careka din sonda girêdana bi Hesen re da. (ll4169) Cedê wan Elewî ne û di dema Artûk (1122) de

hatin Merdine. Bi Artûkoglû û Pezgewran re xisimatî çekirin. Car şaxen wan hebûn.tl42 29)

Lê di dawiyê de Qere Osmanê Pezgewran, bi alîkariya Şahrûh arteşa Beranî belav kir bi şûnde, Çemîşgezek kire bin desten xwe û riyên Memlûk jî bi vî awayî kire bin kontrola xwe. Di sala 1424 an de Farqîn, Tercîl ji de¬ste Kürden Silêmanî û Zerikî hatin wergirtin.ul491) Ew taqtîka Hesenê Dirêj û dewleta wî bû, ku bi riya zimanê xweşû zewacan mîrîtiyên Kurd girêdayî xwe dikir; dema bi hêz bû jî, hemû bi darê zorê kirin bin

desthilatdariya xwe. Her çiqas erdê wan hatibe stendin jî, ew li welatê xwe man. Di dema Sefawiyan de jî ew li ser axa xwe ne.

Herêma Derziniya girêdayî Begê Zirkan, di dema Emîr Hemze de girê¬dayî Sefawiyan bû; di dema kurê wî Emîr Muhammed de bi Osmaniyan re hate girêdan. Lê di dema kurê wî Şah Kulî, di sala 1511 an de li hember Osma¬niyan û polîtîka wan a li hember Kurdan serî hilda, lê têk çû û kurê wî Yakûb Beg hate cîhê wî. 25 salan desthilatdari kir, kurdî helbest nivîsîn û dîwana wî heye. Cîhê xwe da kurê xwe Nûman, lê di şere Şîrvane de Sefawiyan ew û ge¬lek mîrên din ên Kurdan kuştin. Di sala 1579 an de Muhammed hate rêvebiri- yê. Ji bo ku salê wî biçûk bûn, Girdikan êrîçî wan kir. Herêma Girdikan a Zirikî xwe bi Osmaniyan ve girê da. Zirkanê herêma Atakê di dema Emîr Ahmet Beg de bi Osmaniyan ve hate girêdan. Ahmet mir şûnde li ser mîrnîşînâ sê kurên wî lihev nekirin û çûn Stenbolê. Osmaniyan welatê wan kirin sê beş. I^ê Atak raste rast bi Osmaniyan re hate girêdan. (100'300) Di nava gelek mîrîtiyên Kurd de mixabin ew ne lihevhatina birayan gelek caran tê dîtin. Di beşân berê de jî me diyar kiribû ku ew bû sedama gelek ûş û windahî yên welatê Kurdan.

Piştî şere Çaldiranê hêzên Safewî dîsa hatin Amedê û bajar salekê dorpêç kirin. Hêzên Kurd û Osmaniyan, ew piştî salekê ji wir avêtin. Safewî vekişiyan Mêrdînê. Li wir gelek li berxwedan. Di sala 1517 an de, Husrev Paşaye Osmanî bi Qerehanê Safewî ve li hember hevbûn. Şeş hezar eskerên Husrev Paşa li milê rastê bûn. Li mile çepê jî îdrisê Bedlîsî, Emîr Xelîle Eyyûbî, lawê wî waliyê Sasonê Şeref, emîrê Egilê Qasim, waliyê Numeyranê Dawid, waliyê Atakê Ah¬met Zerki bey, serokê êla Şîrvan û Biyikli Hesen Paşa jî li navê bû. Sefawiyan şer wenda kirin. Bi vê re Erxanî, Sincar, Tilafar, Çêrmûk, Sîwerek, Bîrecîk kete destê Osmaniyan. Piştre careka din ârîşî Mêrdînê kirin û kirin bin destên xwe. Bi vê re kelehên

mina Riha, Heskîf û Rakka jî girtin. (l9S2) Wê demê jî em dibînin ku Zerikî mîrîtiye û ew girêdayî Osmaniyan e.

Kanûnî ji sefera Bexda vegerî bi şûnde, êlên Kurdên ku ji ber zilma Yawûz çûbûn çiyayan re destûr derxist ku ew vegerin cîhên xwe. Gor wê Koçgîrî çûn Zara-Sêwas ê; Şahdelî çûn dora Palû û Kîxiyê; Izol û Hiran çûn cîhê xwe yê berê Pertek ê; Balaban çûn herêma Balaban, Şahveliyan, Kimsoran, Hamoçîk jî çûn deşta Tercanê. Qebîla Sîsan a girêdayî Çarikli ya li çemê Kir¬dim çû dora Xinisê. (17129) Ihtîmala yekemîn ewe, ku Zerikiyên li Qoçgîriyê ji vê demê mabin. Wekî mezinên Zerikiyên li Qoçgiriyê dijîn dibêjin: "Lawo lawro em taa ji welatê jorîn hatin, lê em kîngê hatine em nizanin."(18245) Welatê jor Serhede yan Xorasane ew nizanin. Lê gor demê herdû jî rast in. Kanûnî cara

yekemîn di sala 1524 an de çû ser Tebrîzê, wê demê li Erzirûm, Wan û Mûşe kesek nemabû. Cara duyemîn, di sala 1539 an de çû û Dulqadir li Qers, Pasın û Xarpûtêbicîh kirin. F.lên reviyabûn çiyan jî anîn û li Erzirûm, Kîxî û Xarpûtê bi cîh kirin. Koçgirî hatin Zara; Izol û Hiran hatin Pertekê... (,27,0,) Mizgefta Amedê ya bi navê Ulû Camî di dema Qanûnî de, beşa wê ya bi navê "Şaflîler" ji alî begê Atak Emir Ahmed Zirkî ve hatiye çêkirin. (l37'275) Li ser deri û paceyan kîtabeyeka ji sala 1528-29 an mayı heye ku wiha li ser tê nivîsîn: " ...efendiye kralên Ereb û Ecem, di dema lawê Siltan Beyazıt, lawê Siltan Selîm û Siltan Silêman de, ji herêma Amedê û emîrê li Kela Atakê Huseyn Zirkî û kurê wî Emîr Muhammed Emîr Ahmed ev mizgefta nû kir. (137 286)

Di pirtûka bi navê "Kurd û Kurdistan" de tê îddea kirin; ku Zerikiyan, endamekî xwe yê Elewiyê Ereb ji Sûriyê di sala 1122 an de hate Mêrdînê. (2104) Ew îddea li ser nezanînê û agahiyên şaş neqilkirine hatiye sazkirin. Lewra kesên ji başûr hatine hemû ne mecbûr in ku Ereb bin. Ew Kurd in û li destpêkê bi Artuqiyan paşâ jî bi Pezgewran re bi zewacê têkilî sazkirin.

Çar mil in: 1. Tercil (Hezro) û Atak (Lîcê) 2. Dêrzinî 3. Girdikan (Amed û MeyaFarqîn). (2,ü4)

1- Mîrên Dêrziniyê:

Emîr Hemze, demek dirêj li ser fermana Şah Ismaîl kar û barên Dêrzînê dimeşand. Dema ew mir Mihemmed Begê kurê wî bi fermanrewayên Kurdis- tanê ve îtaeta xwe bi Siltan Selîm re pûşkûş kir. Pişti mirina Mihemmed kurê wî Elî Beg derbas bû. Di sala 1535 an de li ser fermana Siltan Silêman, Şah Qulî Begê kurê Mihemmed li ciyê birayê xwe rûnişt. Heşt salan serokatî kir, rojekê ji Stenbolê vedigerî, li bajarê Bolûyê rastî Basir Begê Zerikî yê Begê Girdikan hat û di şen? di navbera wan de mir. Piştî wî, birayê xwe Yakûb Beg bi fermana padişah bû serokê hemû dîwana Zerikiyan. 25 salan serokatî kir bi şûnde kurê xwe Duman Beg da şûna xwe; piştî du salan di şerc Çildar de ji alî Sersoran ve hate kuştin û Mihemmed Beg derbasî şûna wî bû. Niha ku sala 1597 (1005) an e, bi serbixwe fermanrewatiya mîrektiyê dike.1137'267’

2- Mîrên Girdikanê:

Habîlê kurê Şêx Hesen Ezreqî, Dêrzîn fetîh kir. Qabîlê kurê Habîl bi keça Habîl re rabû û rûniştû jê zarokek çêbû. Qabîl ji tirs û şerma bavê xwe re zarok şand Kela Girdikan. Mîrên Girdikan ji neslê wî zarokî ne. Li gor vê, ew kurmamên Mîrên Dêrzinî ne. Mîr Nasirê Girdikanî li ser gundê Minarê yê di navbera wilayeta Girdikan û Dêrzinî de, bi mîrê Dêrzinî re di nav şeran de bû. Di dawî de mîrê Şah Qulî Begê Dêrzinî çû cem Siltan Silêman û fermanek jê stend. Şah Qulî dema ew seh kir çû cem Siltan. Li Bolûyê rastî hev hatin û di şere derketî de Şah Qulî hate kuştin. Xelkên mîrîtiyê li hember Nasir rabûn û bi 30 hevalên wî ve ew girtin. Ew jî hatin daliqandin. Mihemmed begê kurê Nasir hate ser mîrîtiyê. Nasir Begê Kurê Mihemmed jî hate ciyê bavê xwe. Fer- manrewayê Hezzoyê û Zeynel Begê Şârwî bûn sebeba aştiye di navbera wan de

û biryar dan ku Mihemmed Begê Zirkî yê Kedxudayê Mihmmed Begê Dêrzinî û müsebbibe kuştina Mihemmed Begê Girdikanî, li Dêrzînê di bin xizmeta wî de nemine. Mehmûd ji Dêrzinê derxist û çû Bediîse. (157‘369)

3- Mîrîtiya Atak-Lîcê:

Dameziranerê xwe Ehmed Beg kurê Mîr Mehmûdê Zerikî ye; Ehmet Beg bi xwe jî hevçerxê Şah İsmail Safewî bu. Dema Şah İsmail dora Amedê heyna ji dest wî jî kela Atakê girtibû û teslîmî êla Qaçar kiribû. Zirkiyan ew deran terk kirin û çûn cîhen din. Piştî şere Çaldiranê Zirkî jî vegeriyan û li dora herêma "Milh" ku nêzîkî Atakê bi cîh bûn. Serokê Qaçaran sedama wê pirsî, wan jî got: "Ji berê ve di navbera me û Mirdêsiyan de dijminatî heye, ne dure ku ew êrî§î me bikin, ji ber wê heta roja hewa germ bû destûr bidin ku em di wê kela kevn de bimînin." Piştre me derence çêkirin û şeveke ketin hundirê kelê û hemû Sersor kuştin. Ehmet Beg jî, wek serok naskirin. Bi mirina Ehmet Beg re kurên wî (Şahîm, Yusif û Mehmûd Beg) ji bo welat li hev nekirin û çûn dêrivê Osmaniyan. Siltan Selîm jî di nava wan de parve kir û hinek jî kir bin milkê dewletê. Pişt re giştik kete ber destê Osmaniyan. (138"487/157'270) Ji Emîrê Heskîfe bigre heta ya Imadiyê û Zirkî Ahmed, tevhev 25 begên Kurdistanê cîvîn û biryar wergirtin ku li dijî Sersoran di serokatiya Idrisê Bedlîsî de şer bikin. Ahmedê Zirkî erişi kela MeyaFarqînê kir.1138'4931 Ahmed Beg mirovêkî li dora Amedê bi seyidî û taybetmendiya xwe dihate nasîn.<l38~494)

Emîrê Atak, Ahmed Beg, Ulû Camiya Amedê ya hêla şafiyan jî beşek di sala 1528-9 an de tamîr kir. Li ser kîtabek hatiye nivîsîn ku di nava gel de ew wek "Şûx Hesen-i Ezrakî" tê nasîn. (138 61,)

Rêvebirî û hatina Atakê, di nava sê bi rayan de parve dibû. Ji wan bi- rayan Mehmûd mir bi şûnde, lawê xwe Kubat derbasî cîhê wî bû. Di dema begêbegan Ristem Paşa de (1540-43) Şahim Beg bi îxanetê hate tawanbar kirin û bi fermana Kanûnî ew hate iidarxistin. Piştî wê Atak ji

destê begên Zirkî hate girtin. 20 salan bi şûnde Siltan Silêman, bi şerta hilweşandina kela Atakê rê¬vebirî da kurê Ahmed Yûsûf. Ew mîrîtî di dema Fatîh de di destê Welî Beg de bû û heta sala 1597 an dîroka wan tê zanîn, piştî wê dîrokê em tiştekî nizanin. Neviyên wan îro bi paşnaven "Işik, Alparslan û Atalay" derbas dibin. (138'6lü)

4- Mîrîtiya Tercilê:

Di eslê xwe de ji koka Zirkiyan, Tercîl û Atak e. Tercîl du keleyên xwe hene: yek Tercîl e yek jî kela Dar'ayn-Dêr Zêr-Dêr Zin. Dêrzinî û Girdikan jî du şaxen Tercîl û Atak in. Dema Seyid Hesen ji Şamû hate Mêrdînê, li nehiya Ataqê bicî bû û dest bi îbadetê kir. Ew dem, Emîr Artûqê kurê Ekseb li ser navê Selçûqiyan rêvebiriya hikumeta Amed, Mêrdîn, Xarpût, Micengerd û Heskîfê dimeşand. Keça Ekseb nexweş ket, Şâx ew rind kir û paşû dan kurê Şûx Seyid Hesen. Ekseb, nehiya Tercîlê jî da Hesen. Paşû kurê wî Omer hate ser text. Omer, hevçerxê Hesenê Dirêj ê Bayindirî bû. Keça Orner dane Hesenê Dirêj. Di

sala 1508 an de Şah Tsmaîl Amed îstîla kir, li ser texte Tercîlê Ehmed Begê kurê Bûdakê Orner hebû ku ji alî Qizilbaşan ve hate kuştin. Heta serdema Muratê IV an ew der di deste Zerikiyan de bû. (157'274)

Dameziranerê xwe Seyyîd Huseynê kurê Şex Hesenê Zirkî ye. Huseyn bi keça emîrê Artûkî re zewicî bû û Terdi ji wî re hatibû dayın. Şuna wî jî Ömer hate ser text û bi keça vvî re jî Hesenê Dirêj zewicî bû. (13fM88)

Tercil a Zerikan jî di dema Şemsî Beg de bi Osmaniyan re hate girêdan. Di dema kurê wî Heyder de, li Çildirê li hember Sefawiyan û li alî Osmaniyan şer kir û mir. Di dema Muratê IV an de, di birêvebiriyê de Orner Beg hebû û Begê Began yê Amedê ve têkiliya xwe baş bûn. (in0~3l0)

Mirîtiya Qulpê:

Li vê mîrnîşî^ êlên mîna: Silêmanî, Banûkî, Hewêdî, Dilhiran, Bociyan, Zîlan, Besyan; Zikziyan û Berazan dijîn. Di dema Sefawiyan de bi rêya dengdanê ew êlana ji alî Emîr Diyadîn ve dihatin birêvebirin. Diyadîn bi Ustalcû Muhammed ve di nava danûstandinên baş de bû, ku keça xwe Bîkes Xanim dabû Diyadîn. (138'489) Ew êlên ku navê xwe derbas dibin hema hema bi tevahî li Xorasanê ne.

Di şeıû dagirkerên Kurdistanê de pir mixabin ku êl û eskerên mîrîti- yên Kurd, di herdû aliyan de herdem li pâş bûn. A. Tanerî ji vê yekê wiha dinîvîsîne: Dema artışa Osmaniyan diçû Ecem, artâşa Silêman Xan pêşengî dikir. Herî pêş Pînyanîş, piştî wan pêşêngen Mehmûdî (Wan) û piştî wan jî yên Hekkarî dihatin. A^şa îslamê bi wî awayî kom dibû: Li milê rastê ji Kurdis¬tan Isbîrît, Zerikî, Karnî, Hîron, Karkar, Axakîs, Kesan, Mekes, Berdix, Ladik, Benîkutur, Ozecik, Çobanî û Dîegrar. Li milê çepê jî: Lamûs, Adîlcewaz, Erdîş, Bargirî, Bazîd, Akçakale, Çatak, Ekradmagû, Ziyaeddîn bûn.,89 ,26) Hema yek li aliyê Ecem ve jî wek wê bû û êlên Kurdên Sersor li pöş bûn û Kurdan hevûdu qir dikir.

Piştî gelek şeıûn bi Iranê re sîstema îdarî û ya mîrîtiya Kurd jî hate guhartin. Mîrîtiyên berê yên bi tevahî serbixwe bûn bi Osmaniyan re hatin gu- hartin; otonom bûn û destê Osmaniyan hîn zêde dirêj bû kete nava Kurdan. Pâşengû wê jî Tdrisê Bedlîsî bû ku Amed kire 19 sencaxan; ji wana 11 raste rast bi rêvebirên Osmanî re hate girêdan. Yên din jî di rêvebiriya begên Kurd de, girêdayî Osmaniyan û otonom bûn. Vana: Samxan, Qulp, Mîhraniye, Atak, Pertek, Çapakçûr û Çêrmûk bûn. (19‘85) Wrekî xuya dike, Ataka Zerikî otonome.

Piştî sedsala VXI an em Zerikiyan li dora Semsûrê girêdayî Reşiyan(160' 787)dibînin. O. Lutfu Berkan jî Zerikiyan wek cemaat-i Kurdan nîşan dide. (182 47) Li aliyê din li ser girêdana Zerikiyan ya zendên din jî ramanên cûda hene. C. Orhonlû dinivîsîne, ku di salên 1716 an de li 26 gundên

Gerger û Kahta Zurkanli yên girêdayî Reşiyan e bi cîh bûne. Ji bo ku ew Zerikî li gelê wir zilim kirine, ji waliyê Rakkayê re ferman hatiye şandin ku ew bên ajotinî Rakkayê!183' 50> Li wir tiştê derdikeve holê ewe, ku ew Zerikiyên hatinî şandinî Rakkayê,

piştre bİ Kurden din en niha li hêrêmê dijîn ve hatine Anatoliya Navîn. Lê gor Cemal Şener ku wî ji deftera Cevdet Dahiliye hejmar 5657 an girtî jî: Di sala 1780 an de, di dema Abdulhemîdê T an de, gelê nîştecîh ên li Gümüşhane, Kûrûçay, Kemah, Refahiye, Çemîşgezek, Kemaliye û Tercanê sê daxwazname didin padişah ku êlên mina Beyh Hesen, Dersimi, Güveni, Xiranî, Kawî, Ze- rikan, Gernî, Dûçekî, Qoçgirî, Şadî, Bazugî, Bektaşî, Benamî, Çakalî û Güreşi yen li çiyayên Kûrûçay, Kemah, Refahiye, Bektaşli û Ozî (Kûrûçay) û yên li geliyê Kemah û Ezinganê û yen li Tercanê bên girtin û kom bi kom li cîhên din bêne nîştecîh kirin. (I83 51) Di vê belgê de jî derdikeve holê, ku wê demê ew êl parçe bûye û hinek jê berbi bakûr û hinek jê berbi Anadola Navîn çûne. Ji gundiyên Zirqan (Eski Karsak-Polatli) Fîrdewsa (1920) Mihê Ûsê û lawên wê, ew ji Erzirûm Qereyaziyê hatine. Berê ew çûne Inegola Bûrsayê, demeke dirêj li wir rûdinên. Piştre bi Tirkên wir ve nakokiyên wan çêdibin û tên Polatliyê. Gor hesabê me tev kiri, cîh bûna wan îro digihîje beri 200-260 salan.

Zerikî (Eski Karsak) - Polatli

Di sala 1848 an de, êla Qoçgirî ya girêdayî sencaxa Dersime wek navçe hate qebûl kirin û dest bi sandina bacê kirin. Di sala 1849 an de serokê êlê Huseyn Beg bû. (116‘36) Di sala 1856 an de vvek "Aşaîrî Zerikî" li Tekman û Hu- musê navê xwe hatiye nivîsandin. Di sala 1856 an de wek lîva-sencaxa Zeriqî, ji rojavayê gola Wanê heta çerne Hizan û heta Lice dirêj dibe. Ji başûre rojhilatê Elezîzê heta rojhilatê Amedê û tevahî Merdine jî dike nava xwe. Bi wê herêma fireh re Zeriqî tê gotin.!182-46)

Gor rapora dewleta Tirk a bi mora "pir pir dizi" Zirkan yan jî Zerkan 10.000 kes in; Kurmanc in û şafû ne. Hinek li Qereyazi, Tekman û günden wan in; hinek jî: Li Xinis û gundê wê ne. (108'137) Li Qoçgirî-îmranliyê 4311 kes in, Elewî ne û Kurmancî diaxifin û tevlî serhildana Qoçgiriyê bûne. (,(J8 284)Dîsa li Imranliyê êla Qoçgirî heye ku hejmara xwe 12 716 ye; Elewî ne. (108‘28ü) Li îmr- anli-Sêwasê û günden wir, 4311 kesen Zerikî hene, ew Kurmanc û elewî ne.

Têkiliya wan bi êlên di navbera Sûşehrî-Sewas û Refahiyê-Ezingan ve hene. (164

188)

Weki her kom yan ji zendeka Kurd Zeriki jı jı gelek elan pek ten, h ge

lek emen cuda xuya dikin u gor nuseran ji ew te guhartin. Gor Lynch, elen li

Erzirume ev in: Zirekı, Cibran, Zirkan, Zılan, Hesenan, Heyderan, Adaman,

Şıpkan, Mamakan in. Rus Averianov jı vana le zede dike: Cemaldim, Celali:

(Kotan, Soran, Sagan, Keçanan, Dutkan, Kapdekan, Hesenan, Cmankan), Kas

kan, Şadelı, Bedeli, Korucan Kizilbaşlari (Çarık, Balaban, Bal-Uşaxi, Keçilan

u Lolan). (12~279) Li bakure Xinise 7.000 malen Zeriki hene, bi ela Cebranli ve

gelek nezıkı hev in. (l9"184) Zerikan-Zerikı li: Rakka, Semsur, Aksaray, Anıed,

Erzirum, Merdin, Eyyubelı-Aksaray, Sewas, Kahta, Meletı, Muş, Bedlıs, Er-

xanive dijın. (1f,n"l68) Giredavı Meletı, Kaza-ı Kahta Mezraı Zirekanı heye. (97‘3f,1) Li

Qoçgirive 15-17 günden Zerki hene. Dışa li Qoçgiriye elen mına: Atme, Ebba-

san, Bad illi yan, Pezgewran, Canbegan, Çareqi, Dimili, Direjan, Gernı, Ginıan,

Gondilan, Izolan, Şadı, Resûlı, Rîciqi, Pezrewi, Parçiqi, Pîlweng, Qalxan, Qoç-

girî (Ibîkî, Ivîskî, Balo, Sariqî, Cefiqî, Sefiqî, Laçinı), Qurmeşa, Xormeki u Ze-

rikt hene.; 8 4

Zirkiyen ji bere ve li Lice-Hezro u Haniye nıştecıh bun ji bere ve bi kon¬

federasyona Milan re dijminatiya xwe hebu. Ji ber ve yeke, Azız Sebrı Bege

Zerikî (qaymeqamê Huile va kevne Ci ji Lîcê) jî ji êla xwe kesen ji dil komkirin

û tevlî hêzên li hember Tbrahîm Paşaye Milan bû. (138"749)

Zerikî Civata Saf girtî

Lı ser ola Zerikî ya kevn jı ditmen balkeş hene, R. Blaga dıbeje: Mılekı

Ismaılıye jı Zikrıtı ye. Kıtabeka wan a taybet heye; di nimej u diayen xwe de

navê Hz. Muhammed avêtine €i tenê Qiyama Mehdî (rapêrî Mehdî) tînin zi- man. (9S~58) Di destpêkê de jî me anî ziman, ku dema Şexe wan ji Sûriyê hatiye, dest bi propaganda dinî kiriye; piranî êlên ji navenda Xorasanê hatibûn di wê rewş§ de bûn. Hed Bektaşî Welî, Mewlana û hwd hemû oldar in û piranî jî Ismaîlî ne. Hîna jî Kürden Xorasanê dibêjin em berê Ismaîlî bûn. Mezinên Kürden li navenda Anadolê jî berê digotin em Ismaîlî bûn. Di rojên taybet de avîna Zikre dikirin. Belûcîstan-Torbete Kiç-

Çiyayê Murat navenda wan e. Li Belûcîstanê ji wan re Zirkî yan jî Daî tê gotin. Beşek jî li Qereçiyê d i jin.*95'58' Gelek balkeş û ecêbe, ku dide xuyakirin ku Kurd çawa belav û asîmîle bûne. Zerikiyên îro li Sêwasê dijîn ecêbe ku hîna jî bi rojê bawer dikin û sibê zû li ber rojê ayîna xwe ya pîroz pêk tînin. Ew bi wêneyan jî me tespît kiriye. Xêr ji vana jî Kurdên li navenda Anadolê êdî vê ayînê bi kar naynin û berovajî vê xwe sunnî dizanin. Wek mînak parçeyên wan a li Polatli-Enqereyê ku li gundê Zirqan (Eskî Kasrak) dijîn ew ayîna olî terk kirine.

Bi dîtina min ew bi dor û ber re giredayî ye. Lewra Zerikiyên li Polatliyê dora xwe bi misilmanên henefî re dorpêç e; yên li Qoçgiriyê jî elewî ne. Sedema guhartinê ewe.

MILAN

Li ser navê vê konfederasyonê ti agahî nînin; lê vvekî bê texmîn kirin peyveka kurdî ye û jê ev wata derkeve: koma ji parçê mezin veqetiyayî, yan jî koma parçê mezin temam dike. Hinek dîtin hene û îddea dikin, ku beşek ji Kurdan (dibe ku ew Kurdên li dervayê welat bin) di dema kevn de bûne du beş, mîna Mil û Zil an jî Milan û Zîlan. Dibe ku Milan jî navê xwe ji vê veqetînê girtibin.

Di derbarê dîroka Milan ê kevn de agahiyên me ter bikin nînin; agahi- yek ji alî Rişvvanoglû ve tê dayîn. Gor wî di sala 991 ên hîcrî de, ji sencexa Alai- ye, Milan wek "Taîfa Qere Yoruk" dihate binavkirin. (,28'96) Yanê wê demê ew li Antalya bûne. Gelo ew di dema Ebbasiyan de ha tin, an berî hatina Tirkan? Îhtîmaleka mezine ku berî hatina Tirkan ew hatine rojavayê Anadolê. Dîsa jî ew zêde lêkolînê dixwaze. Navê QereYorukê lê hatî dayîn jî balkeşe; lewra di tirkî de kara tê wata reş; gelo ew bi Reşiyan ve yek kom bûn? Elên di nav Milan de û têkiliyê dîrokî yê navbera herdû koman jî wê dîtinê bi hêztir dike. Li ser vê babete birêz Kocadax ji Dîroka Wanê niqteyeka ba^ş radigihîne: " ...Ela Ci- branli ya giredayî Milan, di

sedsala X an de li Teke (Antalya) rûdinişti̇n, ji wir hatin şandinî Rihayê, ji wir jî çûn Wêransehrê. Pişti̇ wê di pâşengiya axayê êlê Şehsûvar de çûn Varto, Bûlanik û Karliovayê. (17'193) Dîsa Qeregeçîliyên giredayî Milan, di fermanên Osmanî yên di sala 975 ên hîcrî de wek "Teke Sencaxi Yo-ruklerî" derbas dibe. (128 %) Di belgeyên Osmanî de Milan wek "Goçer/Tirkmen Ekrad-Ulûs Taîfesî" derbas dibe. (91'62) Ji bo ku ew komên Kurd ji rojava çûne Kurdistanê, nûserên Tirk îddea dikin ku ew Tirk in. Lê ti seneta wan ê tapoya

li ser rojava tunebû ku ew êlên Kurd jî Tirk bin...

Di beşen derbasbûyî de jî min qala secera li gundê Şarike kiribû, ew di sala 1186 an de hatibû nivîsîn ku 12 êl/kom ji Xorasanê hatibûn û di nava wan de Milan jî hebûn û li herêma Dêrsîmê bi cîh bûbûn. Vê yekê Dr Yilmazçelik jî dipejirîne: Piraniya êlên li Dêrsîmê di sala 1300 an de ji Xorasanê hatin, êlên sereke ku hatine ev in: Şex Hesenan, Kureyşan, Hormek, Izol, Şeydan, Karsan, Milan û Bamasûr. (11618>

Li ser Milan dîtineka balkeş jî ji alî birêz E. Kiran ve tê kirin ku konfe-derasyona Milan di sedsala XVI an de hafiye damezirandin. Ew mumkune, lewra di vê sedsalê de erişen heri dijwar li dijî Kurdan pêk hatibûn ku wê yekê ew karê yekîtiyê hêsantir kir. Kiran dibêje: Konfederasyona Milan di 1500 an de hate damezirandin. Eğer di orjînala Şerefnamâ de tune xerê, Şerefxan vvê çaxê êlên li bajaran e nivîsîne, lewra Milan gelê çiya ye. Hinek nivîskar dibêjin ku di dema Yawûz de, hinek êlên Milan li Anadoliya Navîn digeriyane. Or- honlû dibêje di sala 1707 an de Milan li Mêrdînê bi cîh kirin. (I13'75) Li Anadolê bûyîna Milan ji sedî sed e, lê weqas qetî nizanin ku ew di nava kîjan mîrîtî yan jî komê de bûn. Ew dikare bibe Germiyan, Qeremanî û yen din...îddea Orhonlû jî raste, lewra wan salana dest bi cîh kirina êlan kiribûn. Wekî min gotibû Reşî di sala 1692 an de ajotibûn Rakkayê û ji wê demê bi şûnde êdî êl û komên din bi cîh kirin.

Di defterên Osmanî yen piştî sedsala XVI an de em êdî bi hêsanî şopa Milan dibinin. Di deftara Mufassala Osmanî va, di sala 1518 an de, gelek gund bi ser nivîsa "Cemeetî Mîlîlî Bûzûrg" yan jî "Cemeet! Kohpînîklû" hatiye nivîsîn. Li başûre Çemîşgezeke di defterên tahrîr de wek "Karyê-î kişlak-i Ek- radî Zahuranlû" yan jî " Ekradi Kizil Maxaralû derbas dibe. (lls~73) Ew jêdera ji bo me girînge; ji vê em fêr dibin ku Zaxûran-lû Milan in. Zaxûran li Xorasanê gelek in. Bi vî awayî girêdana wan hîn sexlem bû. Gundê Milan yê di sala 1518 an de li Çemîşgezek wek Millîlî Bûzûrg hatiye nivîsîn û ev in: Gundê Bîlîç (27 xane), Cat Kurd,(17) Germîkar,(32) Hidirozu,(28) Komler, Kurdan,(35) Oxûz,(34) Tekûr(19) ê girêdayî nehiya Belde ne. Gundê Mîlîlî jî girêdayî nehiya Gunduze û 33 xane ne. (l18'213) Navê gundên vê komê gelek balkâş in ku mirov nikare vê yekê ji dîroka wan qut bike. Gundê bi navê Oxûz, Germîkar û Kur¬dan wekî dîroka wan Kürdana dide eşkere kirin. Di gelek jêderan de navê êlêka Kurd her dem wek Kurdan derbas dibe. Dibe ku ew Ler yan jî Dim il iyen di bin sîwana Milan an jî navê demi Germiyan de bin. Heman nivîskar wiha berdewam dike: Di defterên Osmanî de, êla bi navê " Cemeeti Mîllîlî Bûzûrg" hatî nivîsîn êla heri zêde ye. Li gelek deran jî ew wek " Ekradi Millî" derbas dibe. Milan li heşt gundên Belda Çemîçgezekê dijîn. Di sala 1518 an de wek 225 xane 45 mucered (şexs), di 1523 an de 248 xane 27 mucered, di 1541 an de 313 xane 207 mucered derbas dibe. (11Â"77) Êlêka bi navê Mililî Kuçuk jî heye ku tê fêhm kirin ku şaxekî Milan e. Li gundên mîna Derderiç û Saxnaklû ya girêdayî Belde dijîn û di sala 1541 an 118 xane û 29 mucered bûn. (US'82)

Di qeydên Osmaniyan de mentalîta wan jî diyar dibe; vê dewletê ji sed-salan vir ve ye tim xwestiye ku Kurdan ji cîhên baş derxe û bajon cîhên bejî û zûva. Yanê, bi Kurdan welatekî nû servebigre û piştre jî ya wan bikujê yan jî bişine çiya...Ji bo vê Qeregeçî mînakeka başe: Ela bi navî

Qeregeçîlî, ji 30 salan zedêtir e ku havînan jî zivistanan jî li sencaxa Teke (Antalya) cotkar in. Tu jî ji min dixwazî ku ew li deftera sencaxa Tekê neyên qeyd kirin. Eger ji 10 salan zêdetir li wan deran rûniştine, divê tu li defterekê qeyd bikî! Sala 975- 1562.!16M1) Ji vê fermanê jî diyar dibe ku di wê demê de jî dubendî dikirine û d ixwestine Kurdan ji cîhên baş derxînin. Kurden ku ew welata rizgar kirine û xwîna xwe rijandine vê carê jî rastî nijatpe resti ya Tirkan dihatin. Doç. M. Eroz dibêje: Navê Qeregeçîlî şaxekî Qeregeçîlî yê Bûrsê ne. Bûne Kurd. (99‘38) Di vir de xapandinek, dirûtiyek û bi dîrokê lîstin heye; ew ne Tirk in ku bûne Kurd! Ew Kurdên ji ber Tirkan hatine Anadolê û li rojava rnîrîtî avakirine, piştre ji alî Osmaniyan ve dîsa hatine şandinî Kurdistanê. Di nav gundên Qeregeçîlî de gundekî bi navê "Salûr" heye. Wekî tê zanîn ew ji 24 êlên Oxûzan yek e. Türkan (Têrikî) berê cîranê Qeregeçîliyan bûn, girêdayî wan bûn, lê paşe bi zorê girêdayî Milan bûn. (99'38> Ji vê mirov dikare derxe, ku ji 24 êlên Oxûz Sal- gur kalên Qerekeçiyên Kurd in. Eger ew îddea rast be, wê demê Qerekeçî berê êlêka serbixwe bû û piştre bi Milan re hate girêdan.

Berovajî Orhonlû E. Xemgîn dibêje: Ela Milan li Mêrdînê dijî. Serokê êlê Gazî Beg çend caran erîşî Salmas kir, bi ser wê de waliyê Tebrîzê Hr Bûdak Xan çû ser Milan. Gazî Beg, ji Osmaniyan û Mehmûdiyên Wanê alîkarî xwest. Mehmûdiyan 10.000 leşker şandin û di sala 1616 an de şer derket û Hr Bûdak têk çû. Di sala 1639 an de peymana Zaxo pêk hat û piştî wê êdî Osmaniyan xwestin mîrîtiyên di nava sînorên xwe de ji holê rakin. Ew plana hêdî hêdî pêk anîn. Ji bo ku Mêrdîn girêdayî Bexda bû, gelê herêmê jî bo giliyan Mêrdîn kiribûn navend û serokê Milan jî jê re çareserî didît. Ji bo vê, waliyên Heleb û Amedê jî jê ditirsiyan. Di sala 1790 an de Silêman Paşa hat Mûsilê û arteşeka ji 30.000 siwariyên Kurd pêk hatî tevlî xwe kir û waliyê Helebê Kosê Mistefa Paşa, waliyê Rakka Ûzûn İbrahim Paşa û Mûtasarifê Meletî Rişvan Paşa jî bi hêza xwe tevlî Osmaniyan bûn. Tîmûr

Pafayê Milan berbi Helebê vekişî. Paşe, di 1793 an de Tîmûr Paşa bû waliyê Rakkayê. Di 1839-1842 an şere Os- maniyan-Misir de serokê Milan Timavî Beg bû û alîgirê Misrê bû. Paşû bi dor Mehmût û İbrahim Paşa bûn serok. Di 1878 an de Osmaniyan esker şandin ser Ibrâhîm Paşa û ew girtin û anîn Sêwasê. (100 339) Bi Tîmûr Paşaye Milan re girê¬dayî gelek kilam li Anatoliya Navîn di nav gel de tên gotin.. .Milan bi Îbrahîm Paşa ve gelek bi nav û deng û bi hêz bûn. Gelek der û doran tevgera wî xirav dikirin û navê wî wek eşqiya belav dikirin. Gerokê Swêdî wê demê wiha di¬ri ivîsîne:

Alexîs Kûylenstîerna, hîn neçûbû cem Îbrahîm Paşa, ji alî der doran ve hatibûn tirsandin û paşa li ber çavên wî hatibû reşkirin. Bi gîştî jî di pirtûka wî nivîsî de, hezkirina ji bo Kurdan kême, tewerê nefretekê mirov dixwîne, li

hember Tirkan u eskeren wan jı berovajı ve ye. Dema diçe Nisebine, wall je re

wiha dibeje: ' Hewce nake ku tu ji Ibrahim bitirsı, berovajı tu dikari mevan-

perweriya wi bibim. Ibrahim Paşa ti caran rewiyen serbixwe zirar nedaye u ew

nekuştine."

Ibrahim Pasa

Çelil ve buyerê wiha dinivîse: Osmaniyan ferman da waliyê Bexda ku

Milan bi sinor bike, lewra dewlet aciz dibû ku Milan heta Heleb û Amedê

bandora xwe belav dibu. Di sala 1791 an de seferek li hember Milan û serokê

wan Temur Paşa pek hat. Ji Helebe wall Koca M. Paşa, ji Meletı wall Rişvanzade

Ömer Paşa u yen din bi eskeren xwe ve erişi Milan kirin, Temur reviya Helebe.11 ' Temur seroke ela Milan bu, demeke li dora xwe hezeke zede civandıye, baca kom dikir jı nedida dewlete u zexte li der u doran dikir. Di sala

1204/1791 an de waliyê Bexdayê Silêman Paşa hêza xwe bi tevahî komkir û

ram), Çadirli Haci Yûsûf, Axapinar, Kekîllîalî, Tatik, Melle Osmanlar, Îkîzler, Hîrfanli ne. Tê texmîn kirin ku ew di sala 1730 an de bi cîh bûn.

Èla Qeregeçiyan bi Milan re xuya dikî jî, li Eskişehir, Bilecik, Bûrsa, Balikesîr û Adapazariyê ne û nifûsa van zêde ye. Tê gotin ku ew ji Kayiyan e. (l28‘ io3) p)j navbera salên 1864-1873 an de êlên bi cîh bûne, yan jî hewl didan ku bi cîh bibin li Balikesîr nêzîkî 40 gund bûn. Li herêma Karesiyê êlên peş ev bûn: Akça Koyûnlû, Bûrhanli, Caferlî, Çepnî, Hardal, Qeregeçîlî, Kilaz, Kubaş, Sox- utlu, Yayci û Bedir bû. Ji wana Kubaş li 28 parçan, Qeregeçîlî jî 14 parçên belav bi cîh bûbû. Hinek ji Qeregeçîliyan li Sarûhan û Hudavendîgarê di sala 1843 an de belav hatibûn bi cîh kirin.*90'118)

Seferoglû dibêje:12 oymaxên Milan hene: Berazî/Barzikanî, Cibran, Qeregeçîlî, Hesenan, Zirkan, Sîpkan, Qerebaş, Şûxan/Şihan, Şidan/Seydan, Hûytû, Biritî, Şikak.*91 62) Berazî, Cibran, Zerikî, Sîpkan komên mezin in. Dibe dema nivîskar van digihîne hev ew wek

konfederasyon bûn. Hemû ew êlên tên hejmartin gelek nezikî hev in û gelek tevlîhev bûne, lê mirov nikare hemûyan têxe bin sîwana Milan.

E. Kiran jî dibêje: Êlên cara yekemîn ku Konfederasyona Milan çêkirin ev in:

1. Xidrekan: VVûranşehr
2. Torûnan:
3. Hecîkan: Sîwerek
4. Kuran: Qerecdax û Wûranşehr
5. Kumnexaşan: Wûranşehr
6. Sînkan: YVâranşehr, Sîwerek.

Piştî wan jî van êlana ketin wê konfederasyonê: Bad ilan, Tirkan, Kejan, îzol, Bergûhana, Meheliyan, Abiyan, Balekan, Nasiran, Şerqiyan (Ezdiyan), Dêwan, Seyidan, Çûvan, Alreşan, Şerabiyan, Dodikan, Bilkasman, Şekîran, Şûxan, Sermastan, Cemaldînan û Erebên Ibnî Xetîban, Advanan, Begaran, Hadîdiyan, Nihêmiyan û Birneşiyan. Tirkan û Kejan 300-500 sal berê ji Şengal bi zorê rabûne. Canbeg û Badilî jî carna xwe wek Milan nîşan didin. (in81) Ew dîtin bi min rastir tê. Lewra, wekî bere jî min nivîsî, gelek ji wan êlên piştre te- vlî bûn, ya ew serbixwe ne yan jî giiêdayî zendên din in. Wek mînak: Nasiriyê girêdavî Reşiyan e.

Li rojhilatê Kurdistanê êlên Milan ev in:

Koseyan	Memikî (A^şa Sor-serê xwe sor girêdidin)
Baliyan	Seyidan
Dodikan	Şûxika
Omoya	Keçêliya
Qirdoya	Sarima

Dêlava	?	

M. E. Zekî jî wan êlêna wek Milan dinivîse. (19180):

Seydan	450	Koçber
Dudikan	7	7
Keleş	7	7
Gomariş	350	koçber
Alkevat	7	7
Kalendala	7	7
Hecîbayram	7	7
Halacarî	700	koçber
Yedîsat	80	koçber
Nasiriyan	70	//
Mirdêsî	1.000	7
Sartan	80	koçber
Matîmiye	800	/t
Barkovan	150	fr
Zeberûfkan	?	li Qerecdaxê
Bucak	?	Zaza, Sîwerek
Beskî	800	—
Kasiyanî	7	koçber
Atirkeşî	7	7
Derican	800	koçber
Molikan	500	7

Rapora êlên Kurdên ji alî dewleta Tirk ve bi mora "pir pir dizî" Milan li Wan-Ozalpê wek 4000 kes nîşan dide û d i bej e şafû ne û nîv koçber in.<10S"Wi

Bi vî awî eşkere dibe ku ti zend, êl û komên Kurdan yen tevhev û parçê nebûne nîn in. IEvajoya dîrokî jî wê yekê dipejirîne. Ew parçebûn û ketina nava hev di nava êlan de; di ziman, ol, kine û çanda civakî de jî derdikeve peşberî me û li benda lêkolînan e.

JEDER Û ÇAVKANÎ

1. Tarih içinde I lavmana-Halil Îbrahîm Uçak-1986-Ankara-H. Yardimlaşma Derneği nol.

2. Kürtler ve Kurdistan-V. Minorsky.Th. Bois,D.N.Mac Kenzie-Doz-96-Çev.Kamıiran Firatli

3. V11-X yy. KÜRTLER-Arşak Poladyan-Oz-Ge-1991-Ankara-Çev.Mehmet Demîr

4. îslamiyete Kadar-Kurdistan Tarihî- Cilt 1 E. Xemgîn

5. Lêkolîn-6, Dr. Cemsit Bender-Instîtuya Berlin

6. Antîk çağda Kürt Tarihî-Torî

7. Kürt Tarihî ve Uygarligi-Dr. Cemşît Bender-Kaynak yayinlari-1991

8. Kürtlerin Tarîhi-Dr. Fritz-Çev. Sînan Şanlier-92-Ist.Hasat Yayinlari

9. Dîroka Kurdistan bi kurtebirî-Ekrem Cemîl Paşa-In.K.Bruksele-1995

10. Tarih ve Uygarlik-Anadolu,Kurdistan,Mezopotamya-Şerefxan Cizirî-Rewşen-1992

11. Kürt kokenî Buyuk Boylar-Welatê, Nêrgiza TORÎ-Koral-1991-îstanbûl

12. Kürtler- Sosyolojik ve tarihi Inceleme-Bazîl Nikitin- Cilt-1-2 Deng-1994-îstanbûl

13. Mervanî Kürtlerî Tarîhî-Ibn'ul- Ezrak-M.Emîn Bozarslan-Koral-1990-Istanbûl

14. Geçmişten gunumuze-Kiirtler ve Kurdistan-Cografya, tarih, edebiyat- K Burkay- Dengl992

15. Malatya Baliyan Aşîretî-Hasan Nedim Şahhuseyinoxlu-1991-îstanbûl.

16. Çend Rüpel ji Dîroka Gelê Kurd-Dr.Mezher Ehmed Elîşer-Stockholm 1991-APEC

17. Doğuda Aşiretler, Kürtler, Alevîler-Bûrhan Kocadax-ANT-1992-îstanbûl

18. Anabasîs-Xenephon

19. Kurdistan Tarîhî-M. Emin Zeki-Beybûn-1992

20. Urfa Haçli Kontluğu Tarihî (1098-1118)1. Cilt-Prof.Işin Demirkent-Tıırk Tarih kurumu Basimevi-1990-Türk Tarih Kurumu Yayinlari

21. Kürt Gerçegi-olaylar,Oyunlar,Çozûmler-Zekeriya Yildiz-Yeni Asya Yayinlari-1992

22. Kürt Aşiretleri Hakkinda Sosyolojik Tetkikler-Ziya Gokalp-Sosyal Yay.-Hazirlayan, Şevket Beysanoglu.

23. Türklerin Tarîhî-Dogan Aveioglu-lV.Kitap-Tekin Yayinlari-1984

24. Türklerin Tarîhî-Dogan Avcioglu-V. Kitap-Tekin Yayinlari-1984

25. Erzincan-Ali Kemali(eski vali)-Kaynak Yayinlari Istanbûl -1992

26. XIX: YY: da Osmanli Imp. Kürtler-Dr.Celile Celil-Ozge Yayinlari-Anakara-1992

27. Tarih içinde Anadolu Sakinleri ve Isyanlar-Ayaklanmalar-Abdulhadi Toplu-Ocak Y.Ankara-1996

28. Osmanlî-Rus ve İran Savaşlari'nda Kürtler 1801-1900-Avyarov-Osmanlicadan Muhammed (Hoko) Varli(Xanî)-Sîpan Yayinlari-Ankara -1996

29. Batili Seyahlarin Gözüyle Kürtler ve Kurdistan-I.Şerîf Vanly-Avesta-1997

30. Çağdaş Kurdistan Tarîhî-Lucian Rambout-Firat-Dicle Yayinİari-1992-îstanbül

31. Anadolu Beylikleri-Prof.îsmaîl Hakki Uzunçarşili-TTKY-Ankara-1988

32. Dîroka Dugelên Kurdan 600-1500 Cilt 1-Abdullah Meme Mehmed(l loko)Xanî Varli-Sîpan- 1997

33. Yezidilik ve Yezidilerih Kökeni-Erol Sever-Berfin-Istanbûl-1993

34. Kurden Haymana-Georges Perrot-Fawaz Husên-2000-apec

35. Anadolu Beylikleri Hakkinda Araştirmalar II, - Prof. Yaşar Yücel, Türk Tarih K.-1991

36. Xorasan Kimin Yurdu? Faîk Bulut- Berfin-1998-îstanbûl

37. Atalarin Karşilaşmasi-Derbend ve Şervan Ülkesinde Kürtler ve Alanlar-Cemal Reşîd Ah- med-Avesta-werger ji Erebî Siraç Direk 1998, Istanbûl.

38. Med İmparatorluğu Sonrasında Kürtler- Tori-Aram yay. 1999-Istanbûl

39. Kiırtlerin Tarihî ve Coğrafyası Hakkinda bîr Araştirma-Kazim Yeşîlgoz- 1996 Ankara

40. Ali'siz Alevilik-Islam'da Özgürlük Arayisi-l,Faik BULUT-Berfin-îstanbûl-1998

41. Babek-Said Nefisi- Berfin-1998-Istabul

42. Kürt Kültürünün Kaynakları ve Uygarliklar Beşîgî Kurdistan-]. Kurdo- Özge yayinlari- 1993 Türkçesi:Huri Tuşik Ozkurt

43. Doğu Anadolu Turk Devletleri Tarihî- Prof. Osman Turan-Bogaziçi Yayinlari-4. Baski

44. Genel Kurmay Belgelerinde Kürt İsyanlari 3- Kaynak Yayinlari-1992

45. Hîwa- Nr 24 -Lêkolînek di rengên ola kurdî ya kevin de- Dilşa Yusif, O.Politika

46. Hurriyet-2. Şubat.2001-Cuma

47. Gürcüler- David Marshall Lang- Ceylan- Nesenur Domaniê-1997-îstanbûl

48. Abul-Farac Tarîhî-l-Gregory Abu'l-Farac-Ömer Riza Dogrul-1987-2.Baski-Türk Tarih

49. Kürtlerin Kökeni ve G. Anadolu Gercegi-M. Sadi Kocas-1990-Kastas yayinlari

50. Êzidivatî-Ola Êzidîyan-Xidirê Silèman, Xelîlê Cindî-Avdar-1995

51. Kiirtler-Minorsky-Koral yayinlari-îstanbûl, 1992

52. Aleviliğin Kökenindeki Mazda Inanci ve Zerdüşt Ogretisi-E. Xemgin-Berfin-1995

53. Mazda Inancindan Aleviliğe .1. Etem Xemgin- Mezopotamya Yayinlari-2000

54. Eskiçağda 1 larran-Aynur Ozfirat-Arkeoloji ve Sanat Yayinlari-1994

55. Urartu Kralîgi Döneminde Eîazig(Alzi)Kemalettin Köroglu-Arkoloji sanat Yay.-1996

56. Yzb. Frederick Burnaby-Kucuk Asya Seyahatnamesi,Anadoluda bir İngiliz Subayi 1876- Sabah Kitapları 1998-Ceviren Meral Gaspirali

57. Ünlü Kürt Bilgin ve Birinci Kuşak Aydinlar-Mehmet Kemal Işik(Torî)-Sorun yay.-2000

58. Tarihselden Güncele Kürt Gerçexî- Mehmet K.Işik(Torî)-Sorun yy.2000

59. Kürtler ve Kurdistan Tarîhî-1- Botan Amedi-Firat-Dicle yy. 1991-îstanbûl

60. Alevi Kürtler- Erdal Gezik- Kalan Yayinlari

61. Divabakir- Dr. Ilhan Akbulut- Tukelmat AŞ. 1996-lzmir

62. Çerkeş Tarihî-Hayri F.rsov Aysun Kamaci-Tumzamanlar Yayincilik-1994-Istanbûl

63. Kürtler-Kreyenbroek-Sperl-Cep-Belgesel-1994 îstanbûl

64. Suryanilerin Kökeni ve Türkiyeli Süryani 1er-Yakup Bilge-1991-İstanbul

65. Kürt Milliyetçiliğinin Tarihî- VVadie Jwaideh-iletişim Yayinlari-1999-Istanbûl

66. Atlas över mänsklighetens Ffiştoria-Bonniers

67. Historia med nya ögon-Anfang Förlag-1996- Stockholm

68. Ninova ve Kalintilari-Austen Flenry Layard-Avesta,Çev. Zafer Afşar-2000

69. Bonniers Varldshistoria- I, II Flodrikena- Bonnier-1982

70. National Geographic- Nr; 4 Solens Faraoner -2001

71. Zerdüst-Proto-Kürt bir peygamber-M. Siraç Bilgin, Rewsen-1997-Stockholm

72. Sumer Rahip Devletinden Halk Cumhuriyetine Dogru-Cilt I-Abdullah Ocalan VVeşanen Serxvvebûn 108- Ekim . 2001

73. Böken Om Vikingarna-Catharina Ingelman-Sundbêrg-Prisma- 1998-Stockholm

74. Svensk-Kurdiska Kontakter Under tusen or- Rohat Alakom-2000-Apec

75. Sumer Rahip Devletinden Demokratik Uygarliga- Cilt II- Abdullah Ocalan Mezopotamya Yayinlari 108- Ekim . 2001

76. Svarta Havet-Neal Ascherson-Ordfront-Veger: Lars G. Larsson-Stockholm 1999

77. Selahdînê Eyûbî-Cankurd-Helvest-Stockholm, 2000

78. Doğu Anadolu da Aşiret Duzenî-Ahmet Ozer-1990-Boyut

79. Sumerli Ludingirra-Muazzaz Îlmîye Çig, 3. Baski-Kaynak Yayinlari-2000

80. I lîtîtler ve Hattuşa-Muazzez Îlmîye Çig, 2. Baski-Kaynak Yayinlari-2000

81. İbrahim Peygamber-Muazzez Îlmîye Çig-2. Baski-Kaynak Yayinlari-2000

82. Osmanli Devletî Tarihî-I cîlt-Zaman Yayinlari

83. Ma'rûzat-Ahmed Cevdet Paşa-Dr. Yusuf Halaçoxlu-1980

84. Herodot Tarîhî-Herodotos, Remzi Kitabevi, 1991, M. Ökmen

85. Adiyaman-însanligin Kultur Mirası-Mehmet Akar-2000

86. Şahname-Firdevsî-Cîlt 1,1956-îstanbûl

87. Arya Uygarliklarindan Kürtlere, Selahaddin Mihotuli, Koral-1992

88. Padişah Analari-Alî Kemai Meram, 1997-Ankara

89. Türkistanli Bir Türk Boyu KÜRTLLR, Avdın Tanerî, T.K.A,Ens.-1983-Ankara a. n

90. Osmanli lmparatorlogunda Aşiretlerin Tskanİ, Cengîz Orhonlu, Eren Yay.

91. Anadolunun îlk Sakînlerî KÜRTLER-Şukru Kaya Seferoglu-T.K.A.Ens. 1982 Ankara

92. Dünden Bugüne Yemce ve Sexbizinlar- E. Yurtdaş, H. Çeker, Faîk Coşkun-2003

93. Geçmişten Günümüze Vîranşehîr-Hasan ÎDÎKÜRT-2000-Mersîn

94. Kürtlerîn îlkçax Tarîhî-Torî, Berfîn yayinlari-2000

95. Handbook Of Iranian Peoples-Rafael BIaga-1997

96. Evliya Çelebî Seyahatnamesi 1-V1 Qld, 1944, Reşat E. Koçu-Türk T. Serîsi

97. Kanunî Devri Malatya Tahrîr Defterî (1560)-Doç. R. Yinanç-Doç. M. Elîbuyuk/1983

98. Abbasîler Donemî-Prof.îhsan S. Sirma-1993-îstanbûl

99. Doğu Anadolu Hakkinda Sosya Kültürel bir Araştırma Doç Mehmet Eroz-1972

100. Osmanli-Safevî Donemînde Kıırdîstan Tarîhî-E. Xemgîn-Cîlt 111-1991

101. Îslamîyetten Osmanlilara Kadar Kurdîstan Tarîhî-Cîlt 11- E. Xemgîn, 1989-Koln

102. Welatê Me- Faysal Daxli, VVeşanen Mezopotamya

103. Türkîye dekî Tarihsel Adlar- Büge Umar

104. Doğu Anadolu da Dil-Onomastik ilişkileri Üzerine bir deneme- Edip Yavuz-1983

105. Abbasîlere Yönelik Dinî ve Siyasî Îsyanlar-Cem Zorlu, Ankara Okulu, 2001

106. Cenupta Türkmen Oymaklari-l-Alî Riza Yalman, 1977- Ankara-Kûltûr Bakanligi

107. Cenupta Türkmen Oymaklari-ll-Alî R. Yalman, 1993

108. Aşiretler Raporu-Çok Gîzlî-Kaynak Yayinlari-1998

109. XVI yy da AD1YAM AN-Sosyal ve Îktîsadî Tarîhî-Mehmet Taşdemir-1999

110. Kara Koyunlular-I-Başlangİçtan Cihan Şah a kadar- Prof. Faruk Sumer-1992

111. 387 Nolu Muhasebeî Velayeti Karaman ve Rûm Defterî-I-(1530, Ankara 1996

112. Safevî Dev. Kuruluşu ve Gelişmesinde Anadolu Türklerinin rolü.Prof- F. Sumer

113. Kürt Milan Aşiret Konfederasyonu-Eyup KIRAN-Elma, 2003

114. Akkoyunlular-Aşîret,Konfederasyon, împ. John E. Woods, Mîllîyet-1993

115. Anadolu da Türkmen Aşîretlerî-Bozulus-1540-1640-Dr Tufan Gündüz, 1997

116. XIX yy Ikîcî Yarisinda Dersim Sancaxi, Doç. Irahîrn Yilmazçelîk-1999 Elazix

117. 387 Nolu Muhasebeî Vîlayetî Karaman ve Rûm Defterî- II- (1530), 1997 (Amasya, Çorum, Sivas-Tokat, Kara-hîsarî Şarkî, Canîk, Malatya, Gerger-Kah ta...)

118. XVI yy da Çemîşgezek Sancaxi, Prof. M. Alî Ünal, TTK-1999 - Ankara

119. îşte Anadolu-Omer Tuncer, 1999 İstanbul

120. Adıyaman Îlî ve İlçeleri, Mustafa Sucu , 1986- 2. Baski

121. SİNCİK, Ekrem Îzî-Malatya 2000

122. Temel Özellikleriyle Kizilbaş Alavîlîk (Talîbîn El Kitabi) T Iaşîm KUTLU

123. 12 îmam ve Alevîlîk-Cemşîd Render-Zulfîkar Yayinlari-5. Baski-1977

124. Alevîlik Bîr Sir Dexildir-Alî Haydar Cîlasun-1995

125. Kizilbaşlixin Felsefî Dayanaklari-E. Erip, S. Güven, A. Kilavuz, A. R. Bîlgîlî-Zulfîkar Yayinlari-1997 Köln.

126. Şarktan Her Zaman Güneş Dogmaz-Rohat Alakom-2003-Apec

127. Doğu îlleri ve Varto Tarihî-M. Şerif Firat-T.K.A.Enst. 1983 Ankara

128. Doğu Aşiretleri ve Emperyalizm- Dr. Mahmut Rişvanoxlu-T.K. Yayini-1978

129. Kose Paşa 1 lanedani-Necdet Sakaoxlu-Yurt Yavinlari-1984

130. Selçuklu Tarihî (511/1118), Dr. Abdûlkerîm Ozaydin-T.T.K. Yayini-1990

131. Oxuzlar, Prof. Faruk Sumer, T. D. A. Vakfi-1999 , Stenbol

132. Çîyayê Kurmênc û Tevgera Murûdan- Roger Lescot-1993 Svvêd

133. Yalan Söyleyen Tarih Utansin-Mustafa Mûftûoglu, IV Cilt-1985

134. Dîvanû Lûgat-ît-Turk Tercûmesî-Cîlt I-Besîm Atalay-1985- TDKY

135. Dîvanû Lûgat-ît-Turk Tercûmesî-cîlt III- B. Atalay

136. Tarîh-î Cevdet-Ahmet Cevdet Paşa-Cîlt I -Hikmet Neşriyat

137. Diyarbakir Tarîhî-Cild I- Şevket Beysanoglu-Ankara 1987

138. Diyarbakır Tarihî-Çild tl-Şevket Beysanoglu-Ankara 1987

139. Bîmebün-Hemar 26- Lêkolîn-Zorabê Bâdı Al olan-2035

140. Rewanduz Kurilen- Edmund R. Leach- Çev: S. Birwan, H. Ozsoy, Rıikon Şengul-2001 Aram Yay.

141. Diyarbakır Evlerî-Orhan Cezmî Tuncer-D.B.B. Yay. 1999

142. Kürtler(îslam Ansiklopedisi dit VI sf 1089-1114)-Belge 2, şayi 2-Komela Çanda Gele Kurd li Stockholm-1982

143. Cihanbeyli 1987-A1Î Fuat Belgin Endüstri Meslek Lisesi

144. Bîrnebün-18- Araşti rma-2002

145. Hiwa-No 131-Heypeyvîn bi Kelîmullah Tewehûdî re-20ü5

146. Dulkadir Beyligi-Pröf. Refet Yinanç, TTK 1989 Ankara

147. Osm ani i Devletî-1600-1908, Sina Aksîn, Metîn Kunt-Cem 1990

148. Lise Tarih 1-Kemal Kara-0nde-2002-03 MEBTTKB

149. Tarih Lise li-prof. K.Y. Kopraman-MEB-2002

150. Türk Beylîklerî-Osrnanli Belgeleri île Kürt Türklerî Tarihî, Mazini Sevgen-1982

151. Belge ve Tu tan a kİ ar i yİ® Dersim Direnişlerî-M. Kalman

152. Skytemâ-Herodots/ Suzanne Unge-1979

153. duldet Fron Steppen-Aron Andersson, Ann Sand wall-Histor İska Museum-1979

154. Kürtler-Mehrdad R. Izady-Doz

155. Osmanli lmp. Derbent Teşkîlati-Cenğîz Orhonlu-Eren-1990

156. XVIII yy Osmanli lmp. Iskan Siyaseti ve Aşiretlerin Yerleştirilmesi-Prof. Y. Flalaçogkı- 1991

157 Şerefnamo Tarîxa Kurdîstanê ya kevn-Şerefxan Bedlîsî-vverger: Z. Av d. APEC

158. Bîr Kabile Ailesinin Tercûmeî Halî ve Nedp Şahin in Hatirati

159. Meleklerin Kûiierînden-Andrew Col lins- Avesta, çev: Zafer Avşar

160. Osm. Imp. Oymak,Aşiret ve Cemaatlar-Cevdet Turkav, Tercüman yy-1979

161. Anadolu'da Turk Aşiretleri (966-1200), Ahmet Refîk-1930 îstanbûl

162. Osmanli Tarîhî-ILAhmet Cevdet Paşa, Hikmet

163. Osmanli Tarihî-III- Ahmet Cevdet Paşa-Hîkmet yy

164. Koçgîri Ulusal Kurtuluş Hareketî-Evîn Aydar Çîçek-1999-APEC

165. îç Anadolu Kürtleri-Nuh Ateş, Komkar 1992

166. Moltke nîn Türkiye Mektup kari-Feldmareşal Helmuth Von Moltke-Hayrullah Ors

167. Doğu Anadolu da Göçebe Kürt Aşîretî-Îsmaîl Beşîkçî-Yurt 1992

168. Tarih Enstitüsü Dergîsî-13, I, Şahın, Osmanli Dev. Aşiretlerin Îsîm almaları -1987

169. Tarih Dergîsî-33, 1638 Bağdat Seferinde Zahire Nakline Memur Edilen Yenî Î1 ve Halep Türkmen 1 erî-î 1 han Şahın 1982

170. Tarih Enstitüsü Dergîsî-12, XVI Asirda Halep Turkmenlerî-Î. Şahın 1982

171. Orta Anadolu dakî Aşiretlerin îskani, Dr. Abdullah Savda m-1993 Samsun

172. Encyklopaedia Iranica-Ehsan Yarshater-lI/5-New York

173. Bîrnebûn-I, I lugo Grothe nîn Seyahatnamesi, Mehmet Bayrak-1997

174. Bîmebûn-IILCelikan Aşîretî-Muzaffer Özgür

175. Bîmebûn-IV- Orta Anadolu Ax. Kürt Motiflerî-M. Bayrak-1998

176. Rişvan Aşiretinin Cemaat,Şahıs ve Yer Adlari üzerine bîr değerlendirme- Yrd. Doç. Faruk S oy'lenıez- K. Ma ra ş Sütçü îmam Üniversitesi

177. Camî'yû Rîsaliyan û hlkayetan-Cankurd

178. Bîrnebûn-ll-Yunak Kürtleri-Kenan û Muzaffer

179. Bîrnebûn-19-Orta Anadolu da îlk Kürt Koyu-Rohat Alakom

180. Bîrnebûn-21-Aşiretler Raporu-Dr Mikaîlî

181. Bîrnebûn-23-Tarîxa eşîra Miakîlîyan li Polatli ye-Dr. Mikaîlî

182. Veger-6-Qoçgirî Bölgesindeki Zeriqîler-Yusuf Zerikî-2003

183. Veger-7- Qoçgirî Bölgesindeki Zeriqî Aşiretinin Tarihî ve Kokenî-2004

184. Det Dodsdomda Folkets Saga-M. Anholm-1906 Stockholm

185. M, Bûyûk Iskendër-Milliyet-Çevîren: Încî Aslter

186. Ülkede Gundem-2005.12.22 Prof. Baskin Oran île Roportaj-P. Selek

187. Şehname-Cîld 11-Fîrdevsî-Verger Necatı Lugal-1992 Istanbû)

188. Aventyr Bland Türkar och Araber- Alexis Kuylenstierna-l912 Stockholm

189. Ozgur Polîtika-5000 yillik şehîr bulundu-Tahsin Oruk 22.01.2005

190. Veger-V- Nivîskar: Abd Al Azîz Omer Flacî Mûsa-Verger: Dr. Xalid Hamza

191. Aı'yonkarahisar Yöresi Türkmen Mezar Taşla ri-M. Seyirci, A. Topbaş

192. H. Tarîxê Kurden Xorasanê-Cild 1, K. Tewahuddî-Meshed

193. H. T. Kurdên Xorasanê-Cîld II, K. Tewahodî-Meşhed
194. Ozgur Politika- Zeynep YÜCE- 26. Temmuz. 2002
195. El û Koçerên îranê, îreç Efşar Sîstanî
196. Ship and Society- Gunilla Larsson-Uppsala Universitet -2007
197. Hereketa Tarîxî ya Kurd li Xorasan-Ustad Rahnêma Dr. Behrewan.
198. Prisma Världshistoria-Joseph Reither
199. Bazil Nikitin- Kurtler

**

DÎROKA KURDISTAN BI KURTEBIRÎ

Ekrem CEMÎL PAŞA
A
DIROKA KURDISTAN
A
BI KURTEBIRI
ENSTITUYA KURDÎ YA BRUKSELÊ
Çile 1995 D/1995/5799/6
© Enstituya Kurdî Ya Brukselê
4, rue Bonneels - 1040 Bruxelles Tel. 02/230.89.30
Fax. 02/230.34.02
Çapxane : Acco - Leuven
PÊŞGOTIN

Ekrem Cemîl Paşa ev pirtûk di sala 1972 de, ango du sal berê mirina xwe, di 81 saliya xwe de, piştî xebat û lêgerîneke 14 salan, li Şamê nivîsî û li Beyrûtê weşand. Piştre, di wê salê de, wî ew wergerand zimanê tirkî. Her du pirtûk jî bi navê C.P.B., ango Cemîl Paşa Burc, weşandin û ji wan jimareke piçûk, nêzîkî pêncî tene, gihandin Ewropayê. Wî gelek dixwest ku vê pirtûkê wergerîne zimanên farisî û fransî jî. Lê, mixabin, temenê (umr) wî ferzend ne da ku vî barê giran biqedîne.

Ji bo ku em vê berhemê ji aliyê dîrokî gelek giring dibînin, nemaze ji aliyê lêgerîna li ser riha (esl) Kurdan ku heta nuha ne ji aliyê Kurdan û ne ji yê Ewropiyan baş hatiye zanîn, û ji bo ku ev cara yekemîn e ku nivîskarekî kurd dîroka Kurdistanê ya kevn bi zimanê kurdî, zaravê kurmancî, dinivîse, me pêwist dît ku em wê ji nuh de, bi kurdî û piştre bi tirkî, biweşînin. Û nuha jî em wê werdigerînin zimanê fransî.

Mixabin, di dawiya vê pirtûkê de, Ekrem Cemîl Paşa rexneyên gelek giran ji malbata Bedir Xan re dike. Ev yek dubendiyên ku hergav di nav van her du malbatan û di nav wan û hogirên din, weka Osman Sabrî, Memdûh Selîm, Nûreddîn Zana ... , de dibûn xuya dide. Ev dubendî ne tenê ji bo nav û kursî bûn, lê usa jî ji sedema cihêtiya zihniyet û dîtinên siyasî bûn. Em îro jî nimûneyên ewha, lê yên bi awayê "nûjentir" dibînin. Em hêvî dikin ku ronakbîr û berpirsiyarên me yên siyasî yên dema me ji şaşîtiyên bav û kalên me fêr bibin û wan dûbare (tekrar> nekin.

- 3 -

Li gel ku di ruvisma çavkaniyên ku nivîskar di dawiya pirtûkê de pêşan dide hin kêmasî hene, ango navên hin berheman, mêjû (tarîx), navnîşan 0. sala weşandina wan ne hergav xuya ne, ewê xwende-vanên me yên hêja bibînin ku ev xebateke gelek ciddî 0. zanyarî ye 0. ku ji bo kirina wê nivîskar bi sivikî tişt ne gotine, gelek westiyaye, xwendiye 0. lêgeriyaye. Em gelek hêvî dikin ku nivîskarên me yên nûjen bikaribin ji vê xebatê kelk (Isttfade) bigirin 0. wê bi awakî ronaktir 0. kûrt.ir 0. bi zimanên cihê jî dewam bikin. Daxwaziya me ew e ku hem gelê kurd 0. hem zanayên cihanê dewlemendî 0. reseniya (esalet) dîrok 0. çanda kurdî nas bikin 0. têbigihêjin ku Kurdan di dîrokê de roline giran 0. mezin lîztine 0. hîn jî dilîzin.

Ji bo ku xwendevan bikaribe vê pirtûkê bi hêsanî bixwîne, me li ber hin gotinên nenaskirî, ku nivîskar bi kar anîne, stêrkek (*) danî 0. ew li dawiya pirtûkê, tevî rêzayê (rna'na) wan, nivîsîn. Bi ser de jî, me kurteyeke kronolojîk ragihand wê.

Ji bo nîşandana dewlemendiya Kurdan, me ji derveyî nexşeyên (xarite) ku nivîskar bi destê xwe çêkirine, hin nexşe 0. fotoyan ji pirtûkên dîrokê yên ewropî xistin nav rûpelên wê.

Em bawer dikin ku piştî xwendina vê pirtûkê ewê gelek xwendevan 0. ronakbîrên me yên giranbuha gotûbêjên germ 0. dirêj li ser riha gelê kurd bikin. Daxwaziya me jî ew e ku meydana lêkolînê li ser babeteke ewqas giran karibe bi vî awayî firehtir bibe 0. ku dîroka gelê me ya dewlemend ciyê xwe yê bilind di dîroka cihanê de bistîne.

Pervîn CEMIL

- 4 -

AMERZIŞ (Beyanê uzur)

Di destpêka mviswara (*) xwe da menewîd (*) kiribû ku em dîroka Kurdistanê ya giştî - ji Berê Zayîna îsa bi 10.000 sal ta îro - binivîsin. Gelek muxabin, ji hin engîzên (*) ku em li vira nikarin bêjin me newîda xwe ne anî cî.

Gertevên (*) ku me di nlvîswara xwe da derbend kirin ji B.Z. 10.000 sal dest pê dikin û di 1918 da radiwestin. Dîroka Kurdan a pey vê hengamê , ano (*) pey sala 1918, em dê wê di derpêça (cild) duyim
da binivîsînin.

Em pir niyazkar in ku îcar em newîda xwe pir zû bi cî bînin û di derpêça duyim da dîroka Kurdistanê
payan bikin.

1. P. B.

- 5 -

KURTEBIRA DIROKA KURDISTAN

Pêşgotin

Ji berê da dîroknivîsên roava û rohilat di nlvîswarên xwe yên dîrokan da li ser Kurdan peyivîne. Lê, heya van demên nêzîk tu nivîs war li ser dîrokgtşa kurdî ne hatiba çap kirin.

Bi zanîna me, kesê ku cara pêşîn "dîrokgiş"a kurdî nivîsiye û belav kiriye ronakrewan (merhûm) Emîn Zekî Beg e.

Emîn Zekî Beg kî ye û li ku xwendiye ? Emîn Zekî Beg Kurdê Iraqê ye, di dema Osmaniyan da ji debistana (*) "Ruştiye" ya Suleymaniyê û debistanên Istanbûlê yên şerevanî (harbiye) û bingehceng (erkanlharbiye) guwahnave (şehadet.name) biriye.

Berê şerê gişkî yê 1914, li Parîs, London, Berlîn û Viyana, di balyozgehên (sefaretxane) Osmaniyan da "ataşê leşkerî" ba.
Di van paytextan da, demên xwe yên vala bêhûde, di çayxane û derûberan da, derbas ne kirine, bi xwendekariya danişmendî (ilm) kariwer (meşxûl) baye. Nemaza, ji hûrbûna (tedqîq) dîrokî ra pir baldarî kiriye, ji nivîs wargehên (kutubxane) wan paytextên mezin çiçend jê hatiye ewçend behremend (mustefîd) baye.
Hezaran spas, Emîn Zekî Beg! Emegên ku dabûn, roniyên çavan ku rijandin, beyhûde ne çûn, meyweyên xebata xwe berhev kirin.
- 7 -
Pey gelek salan, gava Emîn Zekî Beg ji A wrûpa vegeriya Istanbûlê , ji bo dîroka Kurdistanê bi baxolan 0. bi têran hînave (wesîqe) 0. zanişwerî (malûmat) anîn. Ew li vêrastên (heqîqet) ku heta wê gavê ji me veşirî (mechûl) ban 0. ku ji me vedişartin : buhêrka (mazî) Kurdistanê ya deh hezar sal, ronakbûn 0. behadiriya Kurdan ku cihan di matê da hiştiye, cihangîrî (futûhat) 0. şehrevaniyên (medeniyet> wan geriya, peyda kirin, nivîsîn 0. bi nîşane (delîl) 0. aşkariş (isbat) ji me ra anîn.
Emîn Zekî Beg di wan salan da ku li Awrûpa dijiya welatine ava, geline şehrevan 0. serazad didîtin, wan bi Kurdistana wêran, bi Kurdên ku di bin dilî de dinaliyan dihendizandin (muqayese) 0. bedbextiya gelê xwe çêtir fehim dikir : Kurdistan ji sedsalan ve di bin leyandin {îstîla) 0. talankeriya bêdadan da maba, ji avahî 0. abadaniyê bêpar ba.
Emîn Zekî Beg gava hêj zarû ba rewşa perîşanî 0. cefakêşî ya Kurdan dîtiba. Li Suleymaniyê, li debistana "Ruştiye askeriye" cirên (muamele) giran 0. zivir ên mamosteyên ne Kurd dîtibûn, di rewanê (ruh) wî yê ter 0. taze da kîn 0. rikên tal hişyar klrlbûn.
Van xoceyên biyanî çima ji wî ra 0. ji hevalên wî ra zivrayî 0. nedadî dikirin ? Van "muallim efendiyan" çi kesên qurre ban ! Zimanê wan, tevgerên wan bicarekê biyanî ban !
Nivîswarên cografî 0. dîrokî ku dixwendin tê da danava (behs) "Istîmar, Mustamere 0. Mustamer" heba. Van xoce efendiyan ji koloniyên Fransiz, Ingilîz, Belçîkî, Hollandî .... peyv 0. danav dikir. Bêdadiyên ku di van koloniyan da çêdibûn dar 0. dirêj digotin 0. dijimartin.

Emîn Zekiyê xortik mat (heyirî) maba ! Tiştên şayan ên gendgenî (nefret) ku xoceyên wan li ser koloniyan digotin her roj li Suleymaniyê, li ber çavên wî çêdibûn : Walî, Muteserif, Qumandan,

- 8 -

Paşa û Beg, Polîs û Jenderme yên biyanî tûde (ehalî) dêşandin, ziyan didane wan 0. ew bêrûmet (tehqîr) dikirin.

Emîn Zekiyê xortik hûrtk hûrik diponijî: Gelo dibe ku ev biyaniyên ku ji Istanbûl û Anadolê hatine ne kolonîker bin ? Û Suleymanî 0. Kurdistan ne kolonî bin? ...

Emîn Zekî Beg di zarotiya xwe da yek caran diçû gundan 0. zozanan jî. Gundî 0. çiyayiyên ku li van deran bi jîneke sade û asûde dijiyan ew dilda û mat kiribû. Jin û mêr bi hev ra, li van ciyên tenha, lê dilferib, çi jîneke sade û dilkêş derbas dikir ! Livên wan, tevger 0. rewşên wan çiçend çalak 0. ahengdar ban ! Lê, dîlanên wan ? Keç û lawên çeleng, wek selwan bejnzirav û bedew, raken 0. ronak, dest didan hev, govend û bazdan 0. dîlan dikirin. Te digot qey van lîz û bazdan ji ferişte û periyan hînbûne ! Lê, bez ên hespan, hunerweriyên nîşandarî 0. yên şar 0. mertalan?

Emîn Zekî Beg dipirsî : Ma ev tiştên serfiraz û bedew 0. candar giş ên wî ne ? giş ên gelê kurd in ? Ma gelê wî ev çend hunerwer û dilber 0. çalak û hêja ye ? ....

Gava ku Emîn Zekî Beg li Istanbûlê li debistana Herbiyê dixwend, xweşber (tebîî) bi awakî pejilî (mufassal) dîrok û cografya dixwendin : Dîroka kevnare, dîroka sedsalên pêşîn, dîroka sedsalên navîn, a sedsalên nû. Giş bûyerên dîrokî ku di van nivîs waran da hattbûn nivîsandin, nemaza gertevên sedsalên kevnare, li deşt 0. çiyayên ku îro Kurd tê da dijîn, ano di Kurdistanê da, derbas diban :

Akad, Sûmir, Elam, Katî, Kasî, Lolo, Mîtan, Harî, Kildan, Asor, Mad, Paris ... vana giş di welatê îroj ê Kurdan da rahiştibûn hev. Lê, nivîs warên ku ji Emîn Zekî Beg ra dab an xwendin ji bo Kurdan tiştekî ne dinivîsandin. Di nav van nivîs waran da

- 9 -

yek pirs ji Kurdan derbas ne dibû 1 "Muellim efendîna" yek pirs ji bo Kurdan ne digot.

Weyla ! Di wan hengaman da, gelo Kurd li ku bûn? Ma li ser ruyê erdê hîç Kurd tu nebûn ? Il Hêj do, li Suleymaniyê, li gundên dora wê û di zozanan da, Kurdên ku dîtibûn ma ji ku hatibûn ? Ji ku çêbûbûn? Wan Kurdên candar û jînde, çalak û neşerê], jîr û hişyar, behadir û cuwanmerd, ma paşê hatibûn meydanê ? Yan li van ciyan, li bajaran, li gundan, li deştan, li çiyan ji xweber, wek kivarkan, ji erdê şîn hatin ?ll

Mejiyê Emîn Zekî Begê cuwan ê gelek jîr aram û asûdegiya xwe hunda kiribû. Li bersîvên van pirsan digeriya. Dawiyadawî, mejiyê wî yê çalak bersîvên ku lê digeriya peyda kirin: belê, di wan deman da, ano berî zabûna Isa bi sê, çar hezar sal, li Mêzopotamya (navbera her du çeman), li Araratan, li Zagrosan û Torosan, li kenarên Deryayê Sipî, li sînorên Hindistanê, Filistîn, Sûriya û li Misrê pevçûnine dijwar çêbûne. Têklldarên van şeran yek jî Kurd bûn.

Çi sûd (feyde) ! Padişahên Osmaniyan, Şahên Eceman û ferwerên (hukûmet) wan di nivîs warên dîrokan da li ser pirsên Kurd û Kurdistan xêzeke reş kişandine, herifandine, hunda kirine.

Emîn Zekî Beg, hêj ku li ser texterêzên debistana Herbiyê dixwend, rind baweriya xwe anîbû ku têgihîştina gotina "Kurd" di destên zanayên Awrupiyan da bû û ku ji Rohelatiyên paşverû, zorba, bawerhişk, şoven û çewtbawer (xlrafeperest) tiştek umîd kirin ne durust ba, bê hişî ba.

Loma, Emîn Zekî Beg, li ser vê baweriyê, li Awrupa çû pirtûkxanan, geriya, koşiya, peyda kir û nivîsand. Lê, çi kenz û veşare, çi enbareyên (xezîne) giranbeha derveanîn 1

Emîn Zekî Beg, pêy Şerrê Gişkî yê 1914, xwe ji xizmeta dewleta Osmanî kişand û çû welatê xwe,

zanmen ku li ser Kurd 0 Kurdistanê dabûn hev çap 0 belav kirin (1).

Min jî, di vê nivîs warê da, ji bo Kurdan 0 heta ji bo hewes karên ne kurd jî şîrava dîroka Kurd 0 Kurdistan pêşkeş kir. Ez pir xebitîm ku qoqkirin 0 rêzandina nivîswara min gelek sazdar 0 tekûz be. Gelek nivîs warên dîroka kurdî ku beriya vê pirtûka min çap bûne ji rêzandin 0 qoqk irinê ra guh ne dane. Pir dîrokzan hene ku nivîs warên xwe bi zanînên gir 0 hûr dagirtine, lê pir guh ne dane rêzandina wan.

Di nivîs wara min da, nîşaneke din a xuya 0 yekta heye : Min rastiyên dîrokî bê perwa nivîsandine. Rastiyên dîrokî rasterast, ne kêm 0 ne zêde, bi zimanekî vekirî 0 eşkere hatine nivîsandin.
Ez vêya jî pêş we deynim : Min nivîs wara xwe ne bi tenê ji Emîn Zekî Begê ronakrewan girtiye. Lê, ji nivîs wara Hezretî Ayetullah Aqayê Şêx Muhemmed Merdûxî Kurdistanî ku bi zimanê farisî, li Tehranê çap bûye jî stendiye. Ji xeynî van her du peyagewreyan (zat), min ji nivîs warên din jî pir tiştan stendine:
Ji Şerefname, dîroka mîrên Kurdan ku ronakrewan Şeref Xanê Bedlîsî bi zimanê farisî nivîsandiye; ji Rîşeyî Nejadî Kurd ku qehremanê çiyayê Agirî, Ishan Nûrî Paşa li Tehranê, bi zimanê farisî nivîsandiye; ji nivîswarên dîrokî yên fransizî, îngilîzî, farisî, erebî 0 tirkî jî pir tiştên hêja berhev kirine. Nemaza, birrên ku di gihaja "aîd" kişwergîriyên (fûtûhat) li ser vegirtinên islamî ne, min ew ji nivîs warên kevnare yên Ereban stendine. Ev nivîs wara piçûk meyweya xebata min a 13 salan e.
Bi des tûra xwendevanan, ez hinek ji dîroka Merdûx û ji Hezretî Ayetullah Aqa Şeyx Muhemmed Merdûxî Kurdistanî behs bikim : Hezretî Ayetullah di nivîswara xwe da erebbûna xwe dinivîsîne. Mala Merdûx di sedsala sêzdem a mîladî da ji Erebistanê hatiye Kurdistana Îranê 0 li wir bi cî bûye. Ev xanedan hezkirin 0 payekariya (hurmet) Kurdan kar kiriye.
- 11 -
Ji vê malbatê gelek zana 0. xudancah gihîştine. Hezretî Ayetullah bi xwe peyagewrekî zana 0. xudancah e. Çawa ku kurdî, farisî, erebî zane, wusan jî li çend zimanên A wrupayî jî agah e.
Dîroka Merdûx ku bi zimanê farisî nivîsandî ye, meyweya renc a gelek salan e. Hezretî Ayetullah bi sedan nivîs war , kovar 0. pelikan xwendine 0. xwendekariyeke zor kiriye. Pêy zorwest 0. koş, ev manivîsa (eser) giranbeha aniye meydanê.
Dîroka Merdûx du derpêç <Cild) in. Derpêça yekem, ji Pêşdîrokê heya dawiya leyandina (*) Ereban, çi li Kurdistanê qewimiye nivîsandiye. Derpêça duyem, pêy islamiyetê heya îro li Kurdistanê çi çêbûye nivîsandiye.

Ev kes bilind 0. payepak di pelên yekem ên nivîswara xwe da çavkaniyên xwe yên bergiran (muhîm) danîne. Min jî, ew bê guhertin xistin nrviswara xwe. Tê da navên 94 zanayên dîrokê hene. Ji wan jî 25 Awupayî ne. Ên mayîn Kurd, Faris, Kildan, Asor, Ermen, Ereb 0. Tirk in.
Kurdên îro, li cihanê di koşeke tenha da, stemkêş, ji her mafî bêpar, dîl 0. jar, perîşan, nezan, bê weşan, bê xwendegeh, bê nexweşxane, bê derman, pir caran birçî 0. bê nan, tazî 0. bê kiras, bê xwendin 0. bê radyo, 0. bê hertişt dijîn. Gelo ! çawa dibe, ev Kurdê dîla belengaz, xwediyê vê bilindayî 0. ronakiya geş ba ? Han dê çawa bawer bikin ku buhêrka Kurdan ev çend navdar 0. bi deng ba, xudanê gurz 0. xencerên çirsavêj, blrûskrê] ba ? Hîç newêrî (tereddud) mekin! rind bawer bikin! Van nivîsandinên han rastî bixwe ne. Bi hezar sond 0. peyman tê da çilwerî (mubalexe) jî nîne.
Ez - çêtirê wî - em bi kêlên rruriyan xwe napesminin. Tu hawar 0. gazî ji kêlên miriyan naxwazin. Umîda me jîndarî, zindegiya gelê kurd e, jêhatîbûn 0. haydariya wî ye.
Kurd, li gel nezaniya xwe, xizaniya xwe, bê xwedîbûna

xwe, gava ku ferzend bikeve destê wî, do jî û îro jî mûcize çêkirine, ew dê cardin çêbike!
Kurdno ! Dîroka ku hûn dixwînin jê şîretan bigirin! Yek dem bê umîd mebin !
Kurdê cuwanmerd û navdar ! Bikoş ! Bixebit ! Mand ji Kurdan ra ye !

BEŞKIRINA NEJADÊ ENZAN (2) Û
KURD JI KÎJAN NEJADY NE
Beşkirina nejadê enzan (*) li ser du punwerî (nezerlye) çêdibe : ya yekim xwe dispêre nivîs warên kevnare. Punweriya duyim xwe dispêre zanişweriya Antropolojî û Êtnolojî,
Çawa ku di Tewrat û Quranê da hatiye gotin, paş Tûfana Nûh sê kurên peyxember Nûh, ku ji lehiyê reha (salim) mabûn: Ham, Sam, Yafes, sê nijadên enzan serrast kirin : Reşên ser ruyê erdê zaruyên Ham in. Ereb, Ibran, Asor, Aram ... zaruyên Sam in. Nijadê sipî jî ji Yafes çêbû ye.

Di Tewrat û Quranê da, ji nejadê Zer û yê Sor ê Amerîkayê tu gotin nîne. Di beşkirina antropolojîk û êtnolojîk da, nejadê enzan pênc bir hatiye kirin :
Arî, Samî, Mongol (nijadê zer), Reşên Afrîqa, Sorên Amerîka.
Kurd. li ser punweriya yekim neviyên Yafes in. Li ser a duyem Arî ne; ano, Endo- Awrupayî ne, ji nejadê sipî ne. Ev tefsîlatên han ji me ra nîşan didin ku bi Samî û bi Mongolên Tirk ra hîç tevhev iya Kurd nîne.
Pirsa "Arî" gotineke kurdî ye. Arî, ano "Arparêz", bi farisî "Ateş perest ". Ji mêj va ola Endo-Awrupayiyan "Arparêzî" bû û pirsên "Ar" û "Agir" du pirsên kurdî ne, û bitenê di zimanê kurdî da hene. Di Parisî, Efxanî, Hindî, Ingilîzî, Fransizî ... û zimanên din ên Endo- Awrupayî da tu nene. Kurd reha nejadê Endo-Awrupayî aniye meydanê. Eger ev

angaşt <iddia) rast be, giş Endo-Awrupayî ji reha Kurd birr bûne.
Min ev pejlt izahat) li ser pirsa "Ar" da, çima ku ez dixwazim hiş û nêrtinên agahdar û zanayên fîlolog, antropolog û etnologan bikişînim ser pirsa "Ar", ji bo ku baş lê hûr bibin û baş pîşe (tedqîq) bikin.
ÇEND PIRS JI BO ÇEWTBA WERIY A LI SER NEJADt KURD
Berê islamê navên kurdî giş navên arî bûn : navên dewletan, êlan, malbatan, jin û mêran, der û beran, deşt û çiyan, bajar û gundan ... Iro jî pirên van navan arî ne.
Gerdişên (adet) Kurdan jî pirên wan ariyane ne. Kurd hêj ew ji bîr ne kirine û ji bîr nakin.
Eger em qenc binêrin, em dê bibînin ku rûçik. ziman. ol, nav û gerdişên Kurdan ne wek ên Ereban, ne jî yên Tirkan in. Kurd arî ne. Ereb Samî ne, Tirk Mongol in.
Li ser nejadê Kurdan pir efsane û çîrok hatine gotin:
1- Pêxember Suleyman. fermandarê gişî jîndaran bû, ê îns û cinan, tebayên bi bask û bê bask û dêwan jî. Wî rojek çil dêw bang kirin û ji wan ra got : hûn dê herin Awrupayê ji min ra çil keçên dîlber û bijare dê bînin. Her çil dêw jî jê ra temenne bûn û gotin : fermana te ser seran û ser çavan û çûn, berê xwe dan Awrupayê.

Em dizanin, dêw riya salekê di saetekê da distînin. Loma, her çil dêw tavil gihiştin Awrupa 0. li her alî belav bûn. Her yek keçeke dîlber û bijare peyda kir û bi hev ra vegeriyan welatê xwe Filistînê 0. dîtin ku pêxember Suleyman miriye. Her çil keçên dîlber ên A wrupayî man ji dêwan ra. Keç 0. dêw

hevûdu mar kirin, ji wan zaro çêbûn û ev zaro bûn bapîrên Kurdan !

Ma çîrokên ewha hêja ye ku bikevin nivîs warên dîrokan ? Zarû jî bi çîrokên ewha dikenin. Kurdan, hezaran sal berî padişah Suleyman, di ciyên xwe yên îro da fermandarî dikir.

2- Efsana duyem jî çîroka Dehak e ! Goya li ser milên Dehak du mar peyda bûne. Diva bû ku her roj ji van du maran ra du mejiyên zarûkên enzan bidin xwarin. Yek kur û yek keç. Bi salan ev her du mar bi mejiyên zarûkên enzanan hatin xwedî kirin. Lê, Dehak ji bo vê yekê wezîfe da du wezîrên xwe. Wezîrê dilovan gava ku dora wî be, ji dêlva mejiyê enzan mejiyê pez dida maran, û zarûkên ku reha dikirin berdidan çiyê. Ji van Zarûkên revoke gelê Kurd çê ba !

Hinek dîroknivîsên Rohelatê van çîrokên beredayî wek rastî girtine û di nivîswarên xwe da nivîsandine!

Carek, di nivîswarên dîrokan da nivîsandine : 2.500 sal berî mîladê, Kawayê Madî, ano Kawayê Kurd, dijî Dehak rabû. Lê Kurd berê Dehak bi 4.000 sal fermandarên Mêzopotamya bûn.

3- Ev jî çîrokek din e : Xwedê giravî Kurd ji nejadê Ereb in !! Ji nejadê Sam nevîkî pêxember Nah hebûye, navê wî jî Kurd baye. Ev xortê samî û ereb ji Yemenê bar kir, çû Kurdistanê Û Kurd ji vî xortikê ereb çêbûn !!

Xwejber (tebîî>, ev çîrok jî wek her du çîrokên din ef'saneke bê sûda (mana) ye.

Pirsa "Arî" gotineke kurdî ye; ano "Ar parêz", bi farisî "Ateş perest",

Ji mêj ve ola Endo-Ewrupayiyan "Ar parêzî" ba, û pirsên " Ar" û "Agir" du pirsên kurdî ne û bitenê di zimanê kurdî da hene. Di parisî (farisî>, efxanî, hindî, îngilîzî. fransizî û zimanên din ên Endo-Awrûpayî da tu nene. Ano, Kurd reha nijadê Endo-Awrû-

payî aniye meydanê. Eger ev îddîa rast be, giş Endo- Awrûpayî ji reha Kurd bir bûne.
Min van îzahatan li ser pirsa "Ar" da ji bo ku ez dixwazim bala fîlolog, antropolog û êtnologan bikişînim li ser wê, ji bo ku ew lê hûr binêrin û baş pîşe (tedqîq) bikin.
ZIMAN, OL Û TEVGEREN KURDAN
Zimanê Kurdan zimanekî arî ye. Giş gelên arî, yên Asyayî û Awrûpayî, berî zayîna Isa bi deh hezar sal, yek ziman dipeyivîn. Paşê ev ziman bû du bir :
Awrûpayî û Asyayî. Ji vî zimanî ra "Anzanî" digotin. Paşê ji zimanê an zanî gelek birên zimanan çêbûn. Kurdî jî yek ji wan biran e.
Lê pir lehçeyên zimanên kurdî hene. Lehçeyên bingehî yên kurdî sê ne : Kurmancî, Soranî, Zazakî. Giş rojhilatzan pezilandine (qebûl kirine) ku ev her sê lehçe ji rehekê cuda bûne.
Eger îro em rind bala xwe bidin sazmendiya hevokan, kesandina lêkeran, yekbûna hezaran pirsan, wekheviya navên rojên heftê û yên hemû jimaran, em dê qenc bibînin ku lehçeyên kurdî yên îro ji yek bingehê tîş bûne.
Ji bo ku em zanibin ku firehî û giranberiya zimanê kurdî berê sê hezar sal çiçend bûn, ez ji nivîs wara dîroka "Merdûx" rêzên jêrîn, ji farisî, pirs bi pirs, li kurdî vedigerînim : Dîroka Merdûx, derpêç 1, rûpel 41 : "Ji serekaniyên Dicle û Firat heya rexên Deryayê Faris, zimanê kurdî dihat peyivîn. Germiçanka (mîhwer) vî zimanî berê Ararat bû, paşê Zagros, paştir Isfehan, paş tira paştir Hemawend û Medayin bû".
Hin kes dibêjin ku zimanê kurdî zlrzlmanê (lehçe) parisî ye. Rastî ne were ye. Nîşaneyên dîrokî berepaş in. Dîrok diaşkirîne ku Kurd ji Parisan, Eceman, Efxanan kevintir in û gelek jî kevintir in. Fîlolog û dîrokzan yekdeng in ku zimanê kurdî ji zimanê parisî kevintir e û zimanekî bi serxwe ye.
- 18 -
NIVYSANDINt:N KURDî yt:N KEVNARE
Di destpêkê da, ano çar hezar sal berê mîladê, tîpên mîxî ku Sûmir û Akad dişorandin (îstîmal), Kurd jî pê dinivîsandin. Paşê, berî mîladê bi hezar sal,

merivekî bi navê Mlsîsûrat tîpên din çêkirin. Icar Kurd bi van tîpan nivîsandin. Gava Ereban Kurdistan da ber lingên xwe, tîpên Kurdan Misîsûrat bûn. Pey Islamê, bivê nevê tîpên kevnare berdan, bi tîpên Ereban nivîsandin. Îro li gelek ciyên Kurdistanê bi tîpên latînî dinivîsînin.

OLA KEVNARE YA KURDAN

Berî koçbariya gişkî (rnuhaceret.î umûmîye), ano berî ku Kurd ji Iskandinavya rabin bên Kurdistanê, ol û ayinên Kurdan çi bûn, tukes nizane. Ev dem pir dûr, kevin û tarî ne.

Lê, pey ku Kurd hatin welatê xwe yê îro - berî mîladê bi şeş hezar sal, belkî jî deh hezar sal - nîşane (delîl) û şope xuya didin ku Kurd "Ahûra" parêz bûn, ano ronayî û agir diparastin. Ji tariyê dilreş bûn û jê ditirsiyan.

Dereng dereng, wan pirsa Ahûra guhart û di dewsa wê da Ahûra Muzd got. Pirsa Muzd di zimanê kurdî yê kevnare da "xurt" e. Ano, Ahûra Muzd "Xudayê Xurt" e. Bi dem û gavan, Ahûra Muzd bû Hurmuzd. Hurmuzd jî paşê guherî, bû Hurmuz, ano Xudayê Xurt, Xudayê her tiştî, Xudayê ronayî, Xudayê Qenciyê.

Kurdên berê bawer dikir ku rastî ji agir hatiye der. Loma agir diparast, loma agir li ba wan pirfiraz (muqedes) bû.

Kurdan hij ji tariyê ne dikir, jê dilreş bûn, ji kaniya tariyê ra "Ehremen" digot. Ji Ehremen ditirsiyan, bawer dikir ku tarî û neqencî û çepelî Ehremen diafirîne.

Bi vî awayî, du Xudayên Kurdan hebûn: yek Xudayê

Ji ola Kurdan Berê Isa: Ahûra Muzd, yan Hurmuz, Xwedayê Qenciyê yê Zerdeştiyan. Ew dijî Ehremen, Xwedayê neqenciyê, hergav şer dikir.

qenciyê, ano Hurmuz; yek jî Xudayê çepeliyê, ano Ehremen. Di ola Hurmuz da, ji mezinên olê ra "Pîr" digotin. Bi tenê Pîran nimêj dikir. Kesên mayîn, ano tûde (xelk), ji nimêjê wareste bûn.

Paşê, hêdî hêdî, Pîran ola Hurmuzparêzî ji rê derxist: çewtbawerî (xlrafe) , afsunbazî (slhir), cadîkerî, firîbbazî (hîlekarî), derewkerî xistin nav ayinên ola Hurmuz.

XUYABÛNA ZERDEŞTAN, P~XEMBER~N KURDAN Ji bo ku ola Hurmuz vegerînin ser riya berê, riya rastî û qenciyê, bi navê Zerdeşt sê pêxemberên kurd hatin.
Zerdeştê yekim, li bajarê Belxê xuya bû. Dîroknasan ji dema hatina Zerdeştê yekem ra 3.000 sal berê mîladê gotine.
Zerdeştê duyim. Bi gotina dîroknasan, ew Padişah Ferîdûn e. Dema xuyakirina wî berê mîladê 2.040 e.
Zerdeştê sêyim li bajarê Urmiyê, di sala 660 berê mîladê da bûye.
Ev her sê Pêxember ji Kurdên Mad çêbûne. Her sê Zerdeşt jî xwediyên mejikên (fikir) bilind bûn. Armanca wan aştî, asûdegî, bextiyarî û rehayiya enzên bû.
Zanebûna me ya pir li ser Zerdeştê sêyem e. Di nlvîswarên dîrokan da li ser Zerdeştên yekem û duyem pir zanînên me nîn in. Ustubara Zerdeştê sêyem ev bû ku gend û kirêtiyên ku ketibûn nav ola pak a Hurmuz jê biderxîne û ola ronak a Hurmuz vejîne. Ji bo vê yekê, Zerdeştê sêyem gund bi gund, bajar bi bajar digeriya, şorindî (weîz) dikir û şîret didan. Lê, Pîrên wê gavê - ku ew engîzên (sebeb) wê gend û çepeliyê bûn - guh ne dan şîretên Zerdeşt. Ev şîretên hêja ne bi

qiyima Pîran ban. Dilxwaza wan dagirtina zik û bêrîka wan ba. Loma, Zerdeşt ji neçarî çû aliyê Belxê.
Li bajarê Belxê, dest bi şîretên xwe kirin. Gotin û şîretên wî ketin serê Belxiyan û dora Zerdeşt guloriyan, alîkariya wî kir. Bi hevaltiya wan Zerdeşt xurt ba. Nemaza, Padişahê Belxê "Key Lehraseb" hevaltiya Zerdeşt kir û da ser şopa wî. Piştî vê hevaltiyê, jimara hevalbendên wî ba hezaranhezar. Êdî Zerdeşt zor da xebat û şîretê û meydana xwe fireh kir, cardin vegeriya Urmiyê. Icar kesên Urmiyê bi ya wî kir, şîretên wî ketin serê wan, ew jî giş ban hevalên Zerdeştê olpaqij û dan ser şopa wî. Ola Hurmuz, bê ef'sûnkerî, bê derew, bê vajbawerî, gihîşt sadegî û paqijiya xwe ya berê. Ola Hurmuz xurt û gûmreh û geş ba.
Çar aliyên Kurdistanê : Ji Belxê ta Araratan, ji Deryayê Kasî (Qezwîn) ta Deryayê Sipî, bi ola pak a Hurmuz kamiran ban.

Her sê Zerdeşt jî xudan nivîs war ban. Navê nivîs wara Zerdeştê yekim "Zend" ba. Iro li destê Zerdeştiyên Hindistanê ji vê nivîs warê çend pel hene. Ji nivîs wara Zerdeştê duyim, îro tu tişt di destê me da nîne.
Navê nivîs wara Zerdeştê sêyim "Awîsta" ye, li ba Zerdeştiyên Hindistanê Awîsta heye. Awîsta bi kurdiya kevnare hatiye nivîsandin.
Li demên kevn, ano berî Isa û berî Islamê, nivîs warên Kurdan ne bitenê yên olê ban. Kurdan hergav hij ji zanistî û hunerweriyê kir. Padişahê Asor hergav hunerweriyên Kurdan pesinandine. Zanistî û hunerwerî bê nivîsandin nabe. Loma, di bajarên kevnare yên Kurdistanê da, nivîs wargehên gewre heban. Di wan da bi hezaran nivîs war heban : yên ola Hurmuz, rêziman, qanûn, hesab, hendese, dîrok, cografya, tib, stêrzanî, felsefe ....
Lê hezaran mixabin ! B.Z. di sala 331 da Iskenderê Mezin. paşê jî, P.Z. di sala 637 da, xelîfeyê duyem
- 22 -
Ji ola Kurdan berê Isa: Zerdeşt. Pêxemberê ola Zerdeştiyê.
- 23 -
ê misilmanan, Omer Ibin Xettab, ordiya xwe şand ser Kurdistanê, Kurdistan payimal kir, agir berda li nav nivîs wargehên (*) giranbiha û nivîs warên wan giş şewitandin. Nlvîswarên Zerdeştî yên ola Hurmuz jî tevde şewitîn !!
Di ola zerdeştiyan da agir plrfiraz (muqedes) e, lê ne Parastek (me'bud) e, ano ne xwedê ye. Xwedayê kurd ê kevnare yek bû, navê wî Hurmuz bû. Lê van navên jêrîn jî giş navên Hurmuz bûn : Yezdan, Ezed, Ezîd, Xweda, Hay, Homa, Homan ...
Bingeha ola Zerdeşt sê tişt in. Ponja qenc, Peyva qenc, Karê qenc (3). Di wan deman da ola Zerdeşt ola fermî û ya tevayiya Kurdistan û Parisistan bû. Ji kenarên Deryayê Sipî heya Hindistanê ola Zerdeşt hatibû pejirandin.
îro di Hindistanê da hindikek Zerdeştî hene. Li îranê jimara wan ji Hindistanê hindiktir e, nêzîkî 200.000 e. Zerdeştiyên Hindistanê, ji camêriya hindî ya azadîperwer, bi serbestî ayîn û nimêjên xwe dikin, xwenda ne, tuwanger in, pêşveçûyî ne û "modêrn" in. Pir mixabin !

Zerdeştiyên îranê - li gel nejadê wan ê îranî - ji birayên xwe yên misilman hergav zivrî û neqencî dibînin. Zerdeştiyên îranê pir belengaz û perîşan in.
Berî ku em behsa Zerdeşt biqedînin, divê em çend pirs ji ola Êzîdiyan jî bêjin : Êzîdî ji zerdeştiyên kevn mane. Ola êzîdiyan celebekî ola zerdeştî ye.
Me li jor gotibû ku di kurdiya kevnare da pir navên xwedê hene. Yek ji wan navan Êzîd e. Êzîd, ano Xweda. Êzîdî, ano Xwedanparêz. Li nav tûde (xelk) . ji bo êzîdiyan nefehmiyek çêbûye. Tûde çewt fehim kiriye. Goya êzîdî Ehremen (Iblîs) parêz in ! Na-xêr, êzîdî ne Ehremenparêz in. ~zîdî Xwedaparêz in. Bitenê, ew ji ziyandariya (şer) Ehremen ditirsin. naxwazin navê wî bibihîzin.
Hurmuz di ola zerdeştiyan da Xwedayê qencî ye, Ehremen jî Xwedayê ziyankarî ye. Di ola êzîdiyan

da, Êzîd Xwedayê qencî ye, Ehremen Xwedayê ziyankariyê ye. Bingeha ola êzîdiyan Qencîxwazî ye, çawa ku Qencîxwazî bingeha ola zerdeştiyan e. ~zîdî pir hij ji kirina xêrûberan dikin û pir lê go didin. Wek zerdeştiyan, li ba êzîdiyan Pîrên wan bitenê nimêj dikin. Kesên din ji nimêjê wareste ne. Lê, her kes, jin û mêr, salê sê roj divê rojî bigire.
GERDIŞ~N (ADET) KURD~N KEVNARE
Kurd, berê hertiştî, koçer ban. Bi keriyan terşên wan heban, barbirên wan erebe ban, hesp yan ga girêdidan. Paşê, dereng dereng, gava li welatê xwe yê îro bi cî ban, bajar û gund ava kirin, cot kirin, bax û baxçe serrast kirin. Lê, berê hertiştî Kurd şerevan ban, şerker ban, Mertalgêr ban, Şûrhingêv ban, pehlewanên heslnbazû ban !
Kurdên berê, karibûn ji yekê bêtir jin bînin. Tiştên pir şerm û kirêt jinperestî û kurperestî ban. Mahr birrîn tu neba, erêkirina dê û bav, dilxwestina keç û kur bes ba. Kur, heya ne bana mêr, kemer girê ne dida. Keç ne bana jin, derpê li xwe ne dikir, bitenê kirasekî dirêj li xwe dikir. Kurdan berê miriyên xwe venedişartin. Termên miriyan li ser darên bilind, zinarên bilind datanîn, dilxwaza wan ev ba ku termê mirî cardin

jîndar bibe. Paşê dev ji vê gerdişê berdan û termên miriyên xwe dixistin kazan û li ciyên bilind vedişartin.
Kurdan pir hij ji mêvanan dikir, ji mêvanên xwe ra pir mêvannazî û ciwanmerdî dikir. Iro jî, mêvanperweriya Kurdan li cîhanê bi nav û deng e, ev camêriya Kurdan ji bav û kalan gihîştiye wan. Jin, li dema kar, bi mêran ra dixebitîn, alîkariya mêran dikir, serazad û serbest ban, keybanû, ano mezina malê, ban, ji hundirê malê keybanû berpirsiyar ban. Kurdên îro ji keybanû ra kevanî dibêjin.
- 25 -
PADIşAH. FERWERDAR (HUKUMDAR) Q SEREKEN KURD:t:N KEVNARE
Di ezbeta xanedanan da, mezintirê gişa dibû serekê ferweran (hukûmet). Gava karekî bergiran ê xweher-mendê (dewlet) heba, ferwerdar bergerişa (muracaat) rîslplyan û mezinên êlan dikir. Gelek caran, padîşahên wan jî hebûn. Padîşah, di demên dijwariyê da bi serekên birran diencumand (şêwra xwe dikir). Padîşah tê kilê tiştên giran, wek şer, aştî, berevkirina bêş û leşker ... dibû. Karên mayîn di destên serek û rîsipiyan da bûn. Rîspî encumendên (muşawir) serekan bûn, karîbûn têkilî hertiştî bibin.
ÇEKtN KURDÊN KEVNARE
Çekên Kurdên wan demên kevnare ev bûn : Tîr û Kevan, Şûr û Mertal, Gurz, Rim, Xencer, Teber, Kemend, Kevlr-kanîk ...
- 26 -
KURD JI KE DERE HA TIN KURDISTANt Û ÇI GAV HATIN?
KURD ÇEND EZBET Û BIR BÛN? ÇAWA ERD FIREH KIR ?
PAŞÊ ÇAWA IMPERATORIYA KURDISTAN WENDA BÛ?
Me berê gotiba ku Kurd ji nejadê endo-ewropî ne" Endo-ewropî hezaran sal berê mîladê - 10.000 sal, dibe ku hîn bêtir - ji Isandinawya - bi engîzê ku em pê nizanin - koçûbar kirine û hin ciyên Asya û giştikê Awrupa girtine. Di nivîs warên dîrokan da ji vê koçbariyê ra Koçbariya Gişkî dibêjin. Kurd jî di vê koçbariya gişkî da ciyê bav û kalan hişt û ji Iskandinawya berbijêr ban û riya Qafqasan girt.
Wek îro, di wan demên kevn da jî Kurd xwediyên keriyên terş ên bê jimar ban - hesp, pez, ga û çêlek -. Kurd bi milyonan terş diçêrandin, war

diguhartin û berbijêr, ber bi Qafqasan dihatin. War bi war. hêdî hêdî. bê lez û bez. terşên xwe diçêrandin û tim dadiketin.
Ev koçbarî bi sedsalan. dibe ku bi hezaran sal, dirêj kir. Kes nizane Kurd kengî, di kîjan salê da gihîştin Qafqasan. Lê. Kurd li Qafqasan ne sekinîn, berbijêrtir daketin, gihîştin Araratan = ALARODAN, Niştimanê xwe yê îro, Kurdistana Rengîn û Dengîn.
Kurd ji mêj ve du ezbet ban : Katî û Kurtî. Ezbetên Kurdan ji birran çê baban. Kurd gava gihîştin Araratan ban du tîş. Ev du tîşbûna wan ji bo bidestxistina çayirgehên firehtir ba. Kurd xwediyên keriyên terşên giran ban, Araratan bitenê têra wan
- 27 -
c::.
<:>
c::. 0
<::1 '"
c::. e-,
0 ••
u> 0
'"
~ .•.
.... -
cot
:z ••
~ ••
- 1ft
po ""
Nexşeya E. Cemîl Paşa, N" 1 : 10.000 sal Berê Zayîna Isa. Koçbariya gîştî 0. hatina Kurdan ji Skandinavya bo Araratan.
- 28 -
ne dikir. Loma, tîşa yekem ku ezbeta KQTI bû li Araratan ma. Tîşa duyem, ezbeta KURTI, Araratan berdan, çûn aliyê rohilat. dora Deryayê Kaspîn = Kasî.
ERDFIREHKIRINA KURDAN Kûtî.!. Kurdên Araratan

Paşê, bi bîhna fereh, Kûtiyan ji Araratan, bi sê milan, berê xwe da nîvro û roava. û li çarmedorên xwe belav bûn. Ev belavbûna Kûtiyan bi sedsalan ajot. Milê yekem ji bakurê serê kaniyên Dicle û Ferêt. Mêzopotamya, ano navbera du çeman, dest pê kir. da ber xwe heya Deryayê Faris û van dor û beran girtin.
Milê duyem Araratan û zozanên ku serê kaniyên Dicle û Firêt ji van ciyan dlfljikin kirin sernîveka (merkez) xwe û paşê ber bi rojava ve şemitîn. Ji van zozanên bilind, heya çiyayên Torosan, ji Antîto-rosan heya Deryayê Sipî û ji bakurê Iskenderûn heya Lasqiye , Tirablûs û Şam tevde girtin (4). Paşê dereng dereng. Kurd gihîştin Misrê û rexên Deryayê Sor. Kurd di van kişweran (*) da hezaran sal ferman ferma bûn. Wan di van Ciyan da gelek şope (eser) hiştine. wêranên wan heya îro xuya ne.
Milê siyem ji Araratan berê xwe daye Zagrosan û daketiye rexê Diclê. çepê çem girtiye û çûye, xwe berdaye heya kenarê Deryayê Faris û van kişweran giş leyandine.
Kurtî.!. Kurdên dora Kaspînê
Kurtlyan ji Araratan koç kir hatin dora Deryayê Kaspînê = Qezwîn û li dora vî deryayî bi cî bûn. Paşê, ber bi roava û ber bi nîvro belav bûn û klşwerê Azerbaycan girt (5). Ji Deryayê Kaspîn heya Deryayê Paris û Deryayê Umman leyandin. Icar berê xwe da rohilat, heya sînorê Hindistanê

girtin. Bajarê Belx bû paytextê yekem ê Kurtiyan. Di cihanê da, gava karûger (hadise) çêdibûn - berî mîladê 4.000 sal - ji Asor, Kildan, Paris, Ecem tu nav û nîşan tu nebû. Ermenî jî ji Kurdan 5.500 sal bi şûnda li van deran xuya bûn. Ermenî berî mîladê bi 600 sal li van deran xuya bûn. Ermeniyan berî mîladê di 600 da ji Yewnanistana îro, ji Trakya, koç kir hatin dora Erîwanê = Rewanê.
Weka ku em dê paşê bi zûlandin (tefsîlat) bibînin, berî mîladê bi 6.000 sal, gava ku Kurtî hatin vî Niştimanê xwe yê nû, li Mêzopotamya û li dora wî rastî sê ferman wer (hukûmet) û gel hatin : Elam, Akad, Sûmîr. Ji van pêve li roava û rohilatê nîvroyê ciyên Kurdan du hukûmetên xurt jî hebûn : Hîtît û Misir.

Kurdan gelek sedsalan bi van xwehermendan (dewlet) ra pev çûn û li hev xist, şer kir. Bi hinekan ra hevaltî kir, bi hinekan ra neyartî û dijminayî kir. Carna kar kir, carna wunda kir ...
Çawa ku em dê paşê bi givrik (teferruat) bibînin, Kurd berê her xwehermendê bi Akad, Sûmîr û Elam ra şer kirine. Lakaş, Babîl û Suweş, paytextên her sê xwehermendan, bi destê Kurdan pelişîne û wenda bûne.
X wehermendên Asûr û Kildan ku ji wan karûgeran bi 1.500 sal şûnda peyda bûn rahişt Kurdan. Rahiştinek 2.000 sal pir dijwar û dirêj bû. Lê, li dawiya dawî serdestî li ba Kurdan ma. NINW A û BABIL bi gelên xwe va wunda bûn.
Kurdan, pey van şerên Asûr Û Kildan, 300 sal di kişwerekî fireh de jîndarî kir - ji Hindistan heya Deryayê Sipî, ji Qafqasan heya Hebeşistan -. Padîşahên wan xudan dad, welatê wan ava, gelê wan bextiyar û di aştiyê da bûn.
- 30 -
Muxabin ! Hezar muxabin ! Ev bextiyarî pir ne ajot! Iskenderê Mezin, ano Iskenderê MAKDONÎ, hat Kurdistan payimal kir ! Kurdan ji Iskender û generalên wî ziyanên mezin dîtin.
Pir ne çû, Kurdan ordiya xwehermenda SELEFKOS ku yek ji generalên Iskender bû şlkênand, xwehermenda Selefkos wenda kir. Kurd cardin 600 sal gihan azadî û serxwebûnê. Lê, di nav van 600 salan da bê serêşanî ne man. îcar dora Roma hatibû. Roma li cihangîrî digeriya, pir caran rojavayê Kurdistanê li bin lingên leşkerê Roma dima, gellek caran jî Kurdan ordiya Roma dişkênand, bera wê dida, ew diavêt derya.
Lê, bobelatê mezin bi şûnda mabû ! Bobelatê Ereban ! Di sala 637 Mîladî da, leyandina Ereban dest pê kir. Ereb bi xwînrêjî, bêdadî, destdirêjayiya namûs. talankirin, wêrankirin û şewitandina bajar û gundan evçend pêş ve çûn ku meriv nikare van dijwarî û çepeliyan bîne ber çavên xwe, bixe mejî û bîra xwe.
Hêj ku ji birîna cîgeran xwîn dihat, ji dilan pêtên agir hil dibûn, Selçûqên Tirkistanê û Tatarên Mongolistanê û Qaraqoyun, Aqqoyun, Qayxanî bi ser Kurdistana bedbext wek kuliyan bariyan, bi sedsalan di Kurdistana

birîndar û dil bi kul da man, kuştin, talan kirin, wêran kirin, şewat û agir kêm ne kirin.
Van bajargîran (fatlhan). nijdevanan, talankeran, giş bi ordiyên xwe va, bi şahinşahî û mezinatiyên xwe va wunda bûn û çûn ! Bi tenê maf (heq) û rastî payidar ma ! Dê wê bimîne. Kurd hêj meydana pence kerî û pehlewanî bernedaye ! Helbet, dê rojek wê bê, Kurd ji Kurdistana xwe ya giranbiha biyaniyan bavêje derve ! Ew di Kurdistana xwe da serazad û bi serxwebûnî dê bijî !
- 31 -
Ezbetên (qebîle) Kurdan.y. ferweriyên wan ên kevnare
Kurdên Araratê, ano KOtî, sê ezbet bûn : Lolo, Kasî, Sûbarî. Kurdên Kaspînê ku ji wan ra Mad jî dibêjin 7 ezbet bûn : Partas, BOz, Astroşat, Arûzand, Bûdî, Maj, Dîlam. Ji van pêve, ezbetên din jî ku girêdayî yên Mad bûn heb On : Mannaî, Simrî, Sît, Amerdî ...
Berî ku em li ser ferweriya hukûmetên Araratiyan ku li Mêzopotamya 0 dora wê çêbûne tiştek binivîsînin, divê ku em hinek li ser ferweriyên Sûmîr, Akad 0 Elam bibêjin. Kurd, berî mîladê bi 4.000 sal, gava ji serê kaniyên Dicle 0 Ferêt ber bi nîvro daketin, rastî sê Ferweriyan hatin : Sûmîr, Akad 0 Elam. Ev her sê ferwerî pêşveçûtlrên dema xwe bûn : cotkarî, kankerî (maden), avadanî (mîmarî}, pûtt.eraşî ... li ba van her sê gelan pir pêşveçûyî bOn, bi tîpên MtXt dinivîsand. Tîpên mîxî deranderiya (îcad) Sûmîran e.
Heya 1.840 piştî mîladê, di nivîswarên dîrokan da li ser van her sê gelan zanebûneke pir hindik hatibû nivîsandin. Lê, paşê bi xebatên arkêolojîk pir tişt derketin meydanê 0 hîn jî dertên.
Van nivîsandinên jêrîn ku têkildariya Kurdan 0 van her sê gelên Mêzopotamî 0 dîroka wan dike, ez ji nivîs wara MERDQx, derpêç 1, rûpel 133, distînim 0 li kurdî vedigerînim : "Me ji bo vê yekê Ferweriyên Sûmîr, Akad 0 Elam gotin. Dîroka hawişê (qewm) Kurd ji dîrokên hawişên Asorî 0 Kildanî pêştir e, çima ku şope 0 nîşaneyên Kurdî ku derketine ji me ra nivîsandine ku gilorka (kitle) Zagrosê - Lolo, KOtî, Kasî, HOrî - ku nejadên wan Kurd in, bi ezbetên Sûmîr, Akad 0 Elam ra hemdem (di eynî demî de),

hemdasitan 0 hemceng bûn, Di wan deman da navê Asor 0 Kildan tu nebû, Padîşah Kiyomers hêj di zikê diya xwe da bû".

- 32 -

FERWERIY:EN KURD:EN ARA RA TAN :

LOLOBOM, GÛTYOM, KARDÛNY A, HûRî, MITANI, NEHRI, MOşKÎ, XALTI, ALAROD

Ji Kurdên Araratan, ano ji Kûtlyan, 9 Ferwerî derketin. Mîtan, ji van neh ferweriyan, xwehennendeke mezin bû, ji gişan xurtir bû, bi rastî împeratoriyeke fireh, ava 0. şehrevan {medenî} ba. Nehrî jî bi dijwarî û mêrxasiya xwe nav 0. deng dabû. Pir caran Xwehermenda Asor anîba emanê. Eger em rastî bêjin, tev jî, her neh jî xwehermendên xurt 0. hêja ban. Mêr ban, şerker ban, jêhatî û xebatkar ban. Hunerwer û hişdar û zanayên wan pir bûn. Lê zaf muxabin ku kêmşans bûn ! neyarên wan pir ban : Akad, Sûmîr, Elam. Kildan, Asor, Hîtît, Misir, Lîdya ... Paşê jî Iskender û Roma, Ereb 0. Tatar û Tirk !

Min ji neçarî ev çend gotin nivîsandin. Icar ez dê dest pê bikim yek bi yek, serhatiyên her neh xwe hennendan 0. ferweriyan û mîran binivîsim.

FERWERIYA LOLOBOM

Berî mîladê, di 3.700 da, Loloyan li navbera Kermanşah 0. Bexdê cî girtiba. Ji kişwerê wan ra Lo lobûm , ano xwe hermendê Loloyan, digotin. Padîşahê Lolobûm Lasirab 0., padîşahê Akad ê bi nav û deng, Sargûnê yekem, hemdem ban.

Padîşahê Lolobûm, Satan, û Padîşah Naramsîn, kurê Sargûnê yekem, şer kirin 0. Satan şikiya. Lê, paşê,

- 33 -

c::.
0
0> co
0> In
0 ~
0 ••
~ ""
  ...

c'(o•
.. '"
..•..• c-.
0
<
:> 0
• ..
1. c-t

Nexşeya E. Cemîl Paşa, N° 2 : 4.000 sal Berê Isa. Dew letên Kûtlyûm û Lolobûm,

bi alîkariya Kûtiyan, leşkerê Naramsîn şikand û ji hev xist, û Akad û Sûmîr seranser girtin ... Di van salên nêzîk da, li heldora (mintiqa) Zihabê, bi kolan û xepirandina arkêolojîk çarkuncek (lewhak) peyda bûye. Ev çarkunc gihajî (aîd) padîşahê Kûtî û Loloyan, ANOBANÎNA, ye. Berî mîladê, di 2.800 da hatiye nivîsandin. Wê gavê navê heldora Zihabê Hatan bû û di bin destê Loloyan da bû.

Bi gotina rohilatzan Dr Spayzar, berê mîladê, di 1900-1800 da, hin padîşahên Asor jî Lolo bûn. Navê yek ji van padîşahan Lolola bû. Li gora mviswara Spayzar "Mêzopotamya", Lolo li Sûrya jî ferweranî kirine.

Li gora Rojhilatzan Olmistid, li nivîsandinên çend çarkuncên padîşahê Asoran, Asor Nazîrbal, xuya ye ku Lolobûm pir ava bû, di şehrevanî û hunerwerî da pir pêş de çûbû, ewçend ku Asor Nazîrbal ji Loloyan pir hunerwer biribûn Nînwayê. Asor Nazîrbal çar caran leşker şandibû ser Loloyan. Berî mîladê, di sedsala 9 da, paytextê Lolobûm bajarê Nimrî bû. Paşê Asor Nazîrbal ev bajar stand. Padîşahên Asor:

Tîlatpalazar, Adadnîrarî, Toqoltînînota bi Loloyan gelek şer kirine.

Pey wendabûna Asor bi destên Kurdan di sala 612 da berî mîladê, Lolobûm bi xwehermenda Kurdan, bi xwe hermenda Medan ra yekîtî danî.

FERWERIY A KÛTIY AN (6)

Kûtî kevintirê birên Kurdan e. 4.000 sal berê mîladê ji Araratan heya Zagrosan pahn bûbûn, heldora Şehrezor = Suleymaniyeh ferweranî dikir. Paşê, Antîtoros û kenarên Deryayê Sipî jî girtin û gihîştin sînorê Misrê.
Berî mîladê, di 3.700 da, Padîşahê Kûtî yê birrê Zagrosan, ANRIDAPRIZ, gava ku Lolobûm şerê Naramsîn, padîşahê Akad û Sûmîr, kir, çû gaziya
- 35 -
Lolobûm Û leşkerê Naramsîn şikand. Ji vir pêda, Lakaş bû paytextê Kûtlyûm,
Naramsîn Padîşah, kurê Sargonê yekim ê cîhangîr, berê vê şikestinê pir caran wek bavê xwe gelek şer kar kiribûn, xebatên giran biribûn serî. Lê, îcar li ber êrîşên Kûtlyan ling ne da ber xwe û şikest. Xwe hermendên kevnare yên Akad û Sûmîr wenda ban, ji ruyê cîhanê rabûn.
Padîşahên Kûtiyan bi sedsalan navbera Dîcle 0. Ferêt, ano, li kişwerê Akad 0. Sûmîr ferweranî kir. Lê ev demên dîrokê tarî ne, di destê me da şope 0. nîşanên kevn hindik in. Em dizanin ku jimarên padîsahên Kûtiyûm 41 in, lê em navê gişan nizanin.
Di van çil salên dawîn da, bi kolana arkêolojîk , dîrokên Kurdistan 0. Mêzopotamya hinek ronak bane. Em hêvîdar in ku di nêzîk da nîşaneyên pirtir bikevin dest 0. tarîtiya dîrokê ronaktir bibe.
Zanînên ku heya îro di destê me da ne evana ne :
Di sala 310 Berî Mîladê da Elam dirêjî bajarê Lakaş, paytextê Kûtiyûm, kir. Wê gavê Anatomê Yekim padîşahê Kûtlyûm bû. Kûtiyan êrîşa Elam şikand, ordiya Elam perîşan bû 0. reviya. Kûtlyan ketin pey revokeyan û bicarek ew pe lixand , ordiya Elam bi kiş werê xwe va girêda. Berî Mîladê bi 3000 sal, ANA TÛMê Duyim bû padîşahê Kût.iyûm. Elam serê xwe ji na va raklrlbû. Anatom leşker kişand ser wan 0. ew pelaxt. Di 2900 Berî Mîladê da, Padîşah Lokalzakis erdê Kûtlyan firehtir kir, Kildanistana jêrîn jî bi ser kişwerên Akad, Sûmîr 0. Elam da berda.
Di van salan da, bi kolanên arkêolojîk, li heldora Lolobûm, ano navbera Suleymaniye û Bexdê, nivîs warek derket. Di vê pirtûkê da xuya bû ku 2500 sal Berî Mîladê, li Sûmir û Akad, ANûBANINA, ferweranî dikir. Pey Anobanina, padîşahekî din ê mezin hat, navê wî KUTIA ba. Wek padîşahên din bajarê Lakaş paytextê wî ba.

- 36 -
Di van salên nêzîk da, Rohilatzanê fransiz, M. DE SARZK, di wêraneyên Lakaş da şopeyên hêja yên padîşahê n Kûtiyan peyda kirine.
Rojhilatzan Profesor SPYZAR di nivîs wara xwe "Gelên Mêzopotamya" da nivîsiye : "Di welatên Akad, Sûmîr û Elam da, yek ji padîşahên Kûtî ku ferweranî kirine Padîşah Tîrkan e. Di 2800 Berî Mîladê da, padîşahê Asor SARGONê duyim, dirêjî bajarê Lakaş kir. Padîşahê Kûtiyan , Sadak, bi Sargon Padîşah ra şerrên dijwar û xwînrêj kirin. Lê, paşê şikiya û piraniya Kurdan bi xwe ra hilanî û kişiya çiyayê Zagrosê. Paşê Kûtî û Kasî li bakurê Elam xwehermendeke nû pêk anî: "Anzan".
Ferweraniya Kûtlyan li Mêzopotamya, ano li kişwerên Akad û Sûmîr û Elam, bi sedsalan ajot. Herçend ku şehreyariya Kûtiyan li Lakaşê û Mêzopotamya ket destê Asoran, gelê kûtî li Anzan, li Zagrosan, li Torosan û li Sûriya cardin bi mêranî û zîndegî ferweriyeke xurt û serfiraz derbas dikir.
Ji wan deman heta 1100 sal, ano heya wendakirina xwe herenda Asor û serrastkirina xwe hermenda MAD, Kûtî navbera Araratan û Torosan, li Sûrlya bakur, ji kenarên Deryayê Sipî heya sînorên Misrê, xuhermenda mezin a Mîtanî anî meydanê û çend mîrî jî serrast kirin û di gellek keysan da navê xwe bi merdî, cengawerî û mezinî di dîrokan da dane nivîsandin. Padîşahê Asor SALMANZAR, ku di 1180 Berê Mîladê da bi Kûtlyan ra gellek caran şer kiriye, ji bo Kûtiyan ewha dibêje : "Kûtlyûm ji Araratan heya Torosan dirêj dibe. Gelê Kûtî di ezmanên wan deman da wek stêran diçirisîn. Ne bitenê di zîweriyê da, lê di mêranî û wêrankeriyê da jî bi nav û deng bûn''.
Rohilatzan Dr. Spayzar ewha dibêje : "Kûtî di van kişweran da berî Sargonê yekim bi cî bûbûn. Eger em rind çav li hinek nîşaneyan bigerînin em dê bibînin ku Kûtî, ji van deman bi gelek sedsalan bert.lr , pir caran kişwerên Akad vegirtine".
- 37 -
Nivîswara dîrokê ya Ibrahîm Heqqî, derpêça yekim, rûpel 66, 71 û 74, dibêje : "Gava ku Misriyan dirêj dikir - ano dirêjî Sûrya - ev gever di destê sê hawişan (*) da bû : li aliyê bakur Kûtî bi cî bûn. Kûtî milletekî mêr û

dilîr (cesûr) e. Kûtî heya deryayê Ege daketibûn, ji êrîşên Misriyan ra demeke dirêj ber danîn.
Di hengama ezbeta 19'im da, mîrê Kûtî hatine Misrê, bi Firewnan ra peymanên êrîş û pareziye girêdane. Mîrê Kûtî keça xwe ji Firewn ra mahr kiriye".
FERWERIY A ANZAN
Me berê nivîsandibû : Gava ku di 2800 Berî Mîladê da Kûtiyûm li ber Asoran şikestin, padîşahê Kûtiyûm, Sarlaq, piraniya Kurdan hilanîn û birin Zagrosan û bakurê Elamê 0. ji nû va ferweriyekê danî. Kurdan navê vê ferweriyê kir ANZAN.
Anzan bi kurdiya kevn çiya ye, bi kurmancî zozan e. Ferweriya Anzan nêzîkî du hezar sal payidar ba. Paşê Anzan ji gellek birrên Kurdan ra rûnlştgeh bû : Kûtî, Kasî. Amerdî ...
Di van salan da, li heldorên Bextiyarî. di sê ciyan da : Mala Mîr, Gola Fireh û Şkefta Suleyman, hin nivîs tek peyda bûn. Ev nivîstek ên sedsalên 12 0. 13 Berî Mîladê ne. Ji padîşahê Katî Amerdî, Texî-Xî, mane. Rohilatzanê hollandî, Profesor SA YIS, dîtine. Vî padîşahî, di nivîstekên xwe da, ji xwe ra padîşahê Anzan gotiye. Ji Parastekên (Mabût) ku jê ra kişwerê Anzan bexş kiriye spas û şabaşan dike. Li ser pûtên ku ji bo navê parastekên xwe danîne 0. ji wan ra dîwan 0. surûde (qesîde) li dora dîwanên nimêjgehê dane kolan, dûr û dirêj nivîsiye.
Di van nivîstekan da, ji avakirina çêkirina riyan qisse kiriye.
Li Anzanê, Texî-Xî Kûtî-Amerdî derket meydanê, nediyarî (tarîtî> rabû. Baweriya rohilatzanên îro
welatê xwe 0.
Padîşahê Xenî ji dora xnatş bi nehrevaniya

(şehadet) nivîstekên padîşahên Anzan eve: Pirsa Hexamenşî çewtnivîsa Texî- Xî padîşahê Xenî ye. Bi dem 0 gavan dîrokzanên Ereb 0 Ecem pirsa Texî-Xî padîşahê Xenî kirine Hexamenşî. KÛRYŞ, padîşahê Anzan, ji malbata Texî- Xî KOtî- Amerdî, padîşahê Xenî ye. Kûrîş ne padîşahê PASARGAD e, ne Ecem, ne jî Paris e.

Çawa ku - em dê paşê bibînin - gelê Kurd KÛR.ÎŞ kiriye padîşahê gişî Kurdistanê. Paşê Kûrîşê Mezin Lîbya 0 Babîl jî standin, împaratoriya Kurd anî meydanê, ji Kurdistanê gişî ra bû şahînşah.

ŞEHRIY ARIY A KARDÛNY A

Berê jî me dîtibû, Kasî, Kurdên Araratan, ji birrên Zagrosan in. Kasî, di 1977 Berî Mîladê da, gava ku AMIZADOGAyê çarim ferweranê (hukumdar) Babîl bû, pir caran dirêjî Babîlistanê dikir. Wan Babîlistana Rohilat heya kenarê Dicle vesend (zabt kir).

Ferweranê Babîl, AMIZADOGA, ji bo ku karibe li ber êrîşên Kasiyan bisekine, bi Elaman yekdestiya parêzî çêkir.

Kasiyan, di 1960 Berî Mîladê da, di dema ferweraniya SEMOILON da, dirêjî Babîl kir. Lê, ji vê dirêjkirinê tiştek ne bir serî. Pey 200 salên din, Kasiyan bi hevaltiya hemnejadên xwe, KOtî 0 Lolo, di bin fermandariya KANDU, Padîşahê Kasiyan, da cardin êrîş bir ser Babîlê. Icar di 1760 B.M. da wan Babîl vekirand (fetih kir). Di 1760 B.M. da, Padîşahê Kasî li ferweriya AKAMIL, ku hêj nû li tenişta Sûmîr çê bûbû, dirêj kir 0 ew kişwer vekirand.

Çend sal şûn da, padîşahê Kasiyan AKUM-AKRIM kela Duraa, bajarê dawîtir ê Sûmîran, ku li ser Dicle mabû, dorpêç kir. Bajarê Duraa li ber xwe da, pêy dorpêçeke dar (1 dirêj bajarê Duraa pes (*) kir.

Kurd, bi vî awayî, gava ku bûn xwediyên rexê avê,

ra
<>
c::. •
d '"
o• •...
<:) •..
.,; 0
...
"" ..
• ... ...
.-1

-= 0
> 0
- c'4
~

Nexşeya E. Cemîl Paşa, N° 3 : 2.000 sal Berê îsa. Du Imperatoriyên Kurdan : Kardûnya û Mîtan.

navê xwehermenda xwe kir xwehermenda KAROQNy A, ano xwehermenda Kurdan.

Xwe hermenda Kardûnya bû yek ji çar Imparatoriyên ku li cihanê hebûn. Ev çar împaratorî ev bo.n :

KARO QNy A, MIT AN, HITTIT 0. MISR. Em dibînin ku ji çar împaratoriyên ku di van sedsalan da li cihanê hebûn dudu yên Kurdan bûn : KARO ÛNY A 0. MÎTAN.

Kurdên Kasî ku Sûmîr, Akad 0. Elam bindest klribûn 700 sal li vê împaratoriya fereh, bi navê KAROQNy A, ferweranî kir. firehbûna kişwer ji yê HAMORABI, Padîşahê KILOAN, bêtir bû.

Li Babîlê, 35 Padîşahên Kasiyan şehreyarî ajot. Ji hemû padîşên Kasiyan ê bi nav 0. dengtir KAKÛMAKRÎM bû. Kasiyan pir caran ji Asor ra padîşahî kir. Yek ji van Padîşahan AOAS Padîşah bû ...

Paşê, di 1171 B.M. da, di hengama TIKLATNIN, Padîşahê Asor da, ji netîceyên hin gerdişên (hadise) ku heya îro nivîs waran ji me ra ronî ne kirine, Kurd Babîl 0. Babîllstanê berdan, kişiyan çiyayê Zagrosê 0. Anzanê. Asor seraser Babîlistan vesend. Lê, Kurd li çiyê pir ne sekinîn, wan rind karê xwe kir, qenc xwe pêk anî 0. vegeriyan ser Asoran. Leşkerê Asor şikand, Babîla rengîn ji destê Asoran deranî. Li Babîl ji nû da bi cî bûn. Rohilatzan Mr. Hol, di nivîs wara xwe ya Milletên Kevnare yên Rojhilata Navîn da, nivîsiye: " SENEXRIP, Padîşahê Asor, di 805 B.M. da dirêjî ferweraniya Kardûnya kir. Ew, ano Kasî, ji çiyê vegeriyabûn, ji nû da Kildanistan vekirandlbû, li ber leşkerê Senexrip şikiyan. Senexrip Babîl talan kir, xelkê Babilê kire dîl 0. bi xwe ra bire Asorê. Kurd bi padîşahê xwe va kişiyan Zagrosan 0. Anzanê. Lê Kurd, pey vegera Senexrip, dageriyan Babîlê 0. ji nû da ferweraniya xwe ajot".

Kurd ji wê demê 0. şan da bi Kildan ra dostanî 0.
- 41 -
aşîtî danîn. Dostaniya wan heya hevalbendiya Kildan û Mad ajot.
Em dê paşê bi givrikî (tefsîlat) bixwînin ku Kildan û Kurd bi hev ra yekîtî danî û dirêjî Asor kir, paytextê Asor NINA WA dorpêç kir û vekirand. Xwe hermenda Asor bicarek wenda bû. Pey van gerdişan, xwe hermenda Kurdan "Kardûnya", mîna (*) hemî xwehermend û mîrên Kurdan, bi Madan ra yekîtî danî. Kurdan giş xwe da dora MADAN, yek xwehermenda mezin serrast kir. KURDISTAN! Imparatoriya KURDAN !
ŞEHREV ANIY A KASIY AN
Ev çend rêzên jêrîn di şehrevanî û pêşveçûna Kasiyan da xweş nehrevan (şahid) in :
1- Serkargerînê (mudîrê umûmî) giştî yê Muzeya Tahranê, Mr. ANDEREK, di sala 1310 ya Iranî, ya salnama Tahranê da nivîsiye : Hûrûmûrên ku li Kurdistanê jî bin erdê hatine deranîn kardes tên (eser> wan kesên ku. li hengamên ku em jê ne agah in, li aliyê Deryayê Kaspînê bi cî bûbûn van çiyayan in. Ji ber êrîşên ku herdem, ji bakur, li wan dihatin kirin, ciyên xwe berdane, berî 4000 sal hatine Loristanê. Ev Kasî ne, di dîrokan da naskirî ne. Ev hawlş Babîl vekirandiye, di Babîlê da 600 sal fermanferma baye, paşê vegeriyaye çiyayên xwe. Ew bi bazirganiya terş, nemaza bi firotina hespan ji Asoran ra, tuwanger (zengîn) bane.
Ev hûrmûrên delal ên hundirên malan, ev çek 0. rext 0. zînên nazenîn, ev gewher 0. flraqên rengareng ji çesindarî (zewq), tuwangerî 0. geşdariya wan, huner û pîşevaniya wan, şarezayî û hunerweriya wan ra numûne ne".
2- Margueritte RUTTEN, Babilon, rûpel 27, Presses Universitaires de France : "Di van deman da, Hitîtan Babîlî• ştkandlbûn, Babîl standibû 0. seraser wêran û talan kiribû, pûtê MERDOX raklribû, biribû. Padîşahê Kasiyan Akûm-Kakrîm putê Merdûx ji Hitîtan
- 42 -
-5"
.,. 2
<n

et Z
"
z
f
ll
i
1
"""" ~
'i) »
:::
~ ,
~ ~
~
~ ~ t N
,
~ "
~ ~ u ~
~ ~ ~ ~ ~
&; = ~ ~
m c ~
-'< ~ ~ ~ 1 0
~ 0 ~ '" :>
<t ::lE " ~
,
,
,
- 43 -
n
m
şûnda stand, bi ayînên giran û bi helehelan anî Babîlê.

Kasî, ji bo vegerandina nav û dengê Babîla kevn û ji bo avayiya wê pir koşiyan û xebitîn, Babîl rêzand, BabÎl vegeriya û bû Babîla berê, çeleng û lewend.
Padîşahê Kasiyan , NAZI-MAROTAS, ji bo MERDOXt::
PARAZTEK (rnabûd) nêzîkî Babîlê, zevî û erd diyarî kirin û navên diyariyên xwe li ser abîdeyan kolan".
3- Ge. CONTENEAU, Les Civilisations Anciennes du Proche-Orlent , rûpel 100 : "Bicîbûnên Kasiyan li Babîlê, di adetên Babîllyan da pir guhartin çê bûn. Li Babîlê , kincên neqşîn, ustupêçên rengîn xuya bûn. Ji berê, Babîllyan hesp kêm zanîbûn. Kasî hesp anîn Babîlê , li erebeyên şer hesp girêdidan. Erebekêşên Babîliyan ker bûn. Yek ji engîzên serdestiya Kasiyan li ser Babiliyan ev bû".
4- IRANNAME, yan Karname Î Îraniyan der esrî Aşkaniyan, Derpêç 3, birrê yekim : "Kasî, ku di 1800 B.M. da li Babllê ferweranî dikir, bapîrên Kurdên Îro ne, ji nav wan merivne mezin, feylesof û zanayên xurt rabûne".
Lê dema zanayên ewrûpayî û yek jî ji zanayên Iranî ku di şehrevanî, tuwangerÎ, geşdarî (refah) û dilaweriya wan da, di gezdika (derece) pêşveçûna Kasiyan da nehrevanÎ dikir, em dê binêrin zanayê dîroka Tirkan, Ahmet REFIQ Beg, ji bo Kasiyan çi dibêje ? "Tadeyên Mêzopotamya li nîvro Sûmîr, li bakurr Akad ban. Ev her du hawiş ne lndoewrûpayî ban, Tûranî ban (7). Li aliyê din ê Dîcle ji nejadê lndoewrûpayî Kasî heban, yanî Kurdên nuha. Hîn berjêr jî Elam, yanî çiyayî heban. Paytextê vana bajarê saz ba. "Qissî" ta Îro di hovîtiyê da mane ... ".
Tirkê fêris rik û kîna ku ji bo Kurdan ji bapîrên xwe mîrate gtrtfbûn nikarîbû veşêre û eşkere neke. Zanayên Fransiz û Iranî evçend Kurd pesinandine. Zanayê tirk jî Kurd bi hovîtî şermisandine (ltttham). Hatta nivîskarên dîrokan giş ji vî hawlşî ra Kasî

gotine. lê Refîq Beg Kaslyê narîn kiriye Qlssî, ano kiriye stûr ûIdrêt.
Tirk dibêjin : "bi jêkirina şlf't (zebeş) dilê meriv hênik nabe" û Kurd dibêjin : "rim di têran da nayê veşartin". Ahmet Refîq Beg hingî eniriye, xwe ji bîr

kiriye, di nivîswara xwe da ne nivîsiye ku Kurdan Babîl vekirand û 700 sal li Babîlê fermanferma bûn.
Hltîtên zorba ji ciye xwe 2000 kîlometre dûr hatfbûn, Babîl standibû, talan û wêran kiribû û pûtê Merdûxê parastek jî biribû. Gelek salan bi şûnda padîşahê Kasiyan, şahînşahê Kurdan, Akûm-Akrîm leşker kişand ser Hitîtan û ew şikandin, Pûtê serfiraz (muqeddes) ê Merdûxê parastek şûnda anî Babîlê û danî ciyê wî yê bilind û pir homan. Bi vî awayî, padîşahê Kurdan, Akûm- Akrîm, camêrî û çelengiya Kurdan eşkere kir, danî meydanê.
Kurd ne hov û kûvî ne. Kurd li pîrejin û kalemêran, jin û zarokan, dîl û birîndaran destê xwe bilind ne kirine. vêrfireşiya hanê bi ser xwe da ne anîne. Zanayê Tirk baş bîr dibe hov kî ye û kî bê dilovanî ye. bi sungiyan zikê diyan didirrîne ! ke leşrnêran, selûbejnan kî ji zinar û fîsan gêr dike, kadînan bi hezaran zarûkên yeksale û dusale tijî dike, bi ser wan da gaz dirijîne û agir berdide û dişewitîne ! li Dêrsimê hivdeh şkeft ji jin û zarok û pîr û kalan tije dike û derê şkeftan bi çimento û keviran dihûne û dipêçe! Ey zanayê Tirk ! Te îcar nas kir hov û cenawer kî ye ? Kurd e yan Tirk e ?
HQRI : MIRIY:EN HÛRIYAN
Hûrî blrrekî Sûbariyan in. Bi nivîsandinên dîrokan ji gelên Kurdan ku bertirê gişan bajaran ava kirine, bûne xwediyên şehrevanî, Hûrî ne.
Hûrî li zozanên bakurrê Mêzopotamyê, li Amed {Diyarbekir>, Xarpêt, Dêrsim cî glrtlbûn. Paşê Asor û Sûriya jî xistin bin destên xwe (8).
- 4S -
Ji hunera Hûriyan : Şêrek ji bronz li ser nivîseke li ser kevir a padîşahê Harî "ûrkiş".
Nêrgiza Torî, KUrtlerde sanat
- 46 -
HOriyan ji 4000 sal B.M. heya 2000 sal B.M., ano 20 sedsal li wan derên ku navên wan li jor derbas bûbûn mîrlyên bê jimar serrast kirin, jîneke bextiyar û geş derbas kir.
Di wan deman da, Mîtaniyan, ku ew jî birrekî Sûbariyan in, xwe da xuya kirin. HOriyan xwe gihand birayên xwe yên Mîtanî 0 bi awakî nîv-serbixwe bi Mîtaniyan ra hemjîndarî kir.

Evçend ku HOriyan bi Mîtaniyan ra yekîtî çêklribû, cardin erdên xwe fireh kirin, li Sûrlya 0 Filistînê pir ciyan vekirandin.
Gava ku di 1483-1466 B.M. da Fîrewnê Misrê Tûtrnezê sêyim dirêjî Filistîn 0 Sûrlya kir, mîrê HOriyan ferweranê bajarê Kadeş, li Sûriya, li ser çemê Asî bi pêşberê Fîrewnan ra şer kir 0 bajarê Mêcîddo 7 mehan ji Firewnan parazt. Bajarê Mêcîddo li Filistînê di bin ferweriya HOriyan da bû,
HOriyan bi Mîtaniyan ra wek yek xwe hermend, heya sedsala 12yim B.M., bi yekîtî 0 xurtî hemindarî kir.
Pey Mîladê, di sedsala 12yim da, Hitît, hevsiyê (cîran) HOrî 0 Mîtaniyan, pir xurt bûbû, hergav êrîş li ser wan dibir. Van êrîşên hergave xwehermenda Mîtan 0 HOriyan wenda kir. Paşê, Mîtan 0 HOriyan xwe gîhand Araratan 0 xwe tevî Nehriyan kir. Nehrî jî birrekî Sûbarî ne, di van salan da li Araratan ferweriyeke bi nav û deng û xurt serrast klribû.
ŞEHRIY ARIY A MÎTAN
Mîtanî jî Kurdên Araratan in 0 birrekî Sûbarî ne. Bêtirê sedsala 20im B.M. belav bûbûn, glhajtlbûn Antî- Torosan.
Ji sedsala 16im pêda, bi lez 0 bez bi pêşve çûn, di demeke dindik da împaratoriyeke xurt, ava 0 şehrevan

t---

anî meydanê. Çawa ku me berê gotibû, Mîtaniyan di van sedsalan da yek ji çar Împaratoriyên mezintir ên cihanê serrast kir. Ev dewlet Mîtanî, Kardûnya, Hitît û Misr bûn. Paytextê Mîtaniyan bajarê Waşqanî (9) bû, Rojhilatzan JONSON dibêje : "Mîtan navê ezbet e, navê hawişê wan Sûbarî ye".
Di van salên dawîn da, li Kerkûk, Hewlêr, Boxazkoy, Serê Kanî û Cerablûs kolanên arkêolojîk çêbûn. Bi van ger 0 kolanan, bi hezaran perçeyên eserên kevn ên Mîtaniyan peyda bûn. Hîn paştir, kaxizek li ser navê TOSART A, Padîşahê Mîtan, derket. Ev kaxiz bi 600 rêze e, bi zaravê Mîtanî hatiye nivîsandin. Rojhilatzan POREKS ji bo wê kaxizê dibêje :
"Zimanê ku di vê kaxizê da hatiye nivîsandin hevrêsi (terkîbî) ye, ango ji Kurdiya Ararat 0 Qafqas e".

Nivîswara Tarîxî Ilmûmî Muerrixîn dibêje : "Di 1600 B.M. da, ferweriya Mîtan jêhatî, şehrevan 0 pir xurt bû. Ji alîkî Kurdistana roava gişî : Sûriya. Amûra, Arafa (Ankara, Anadol) û Asor li bin destê Mîtan bO 0 ji Mîtan ra serfirû dibûn".

MîtanÎ gelek sedsalan ferman-fermayên rohilat 0 roava bûn : Asor bicarek ji Mîtan ra serflrû bûn.

Hitît 0 Mîtan gelek salan neyartiya hev kir 0 di navbera wan da şerne dijwar çê bûn. Ji bo navçeya Sûriya, Mlsr 0 Mîtan ji hev pir xwîn rêtin. Mîtan, bi sedsalan, ji bo pêşhatina Misr ber bi rohilat bendeke xurt bû. Misr bi sedsalan nikarîbû rohilat bide ber xwe û bileyîne. Paşê, Misr û Mîtan bi hevra aştî, yekdestî 0 dostanî girêdan.

Di 11•83 B.M. da, Fîrewn Tûtrnêsê sêylm ket sewda veklrandlna Rohilatê. bi leşkerine xurt dest bi êrîşa Filistîn 0 Sûrlya kir. Mîtani, bi alîkariya HOriyan, bi mêranî li ber êrîşên Fîrewnan sekinîn. Lê, li ber piraniya leşkerê Pîrewnan, sekna wan heya dawiyê bê îmkan bû. Mîtanî ji bo ku karibin li ber êrîşên Fîrewnan bendeke xurt deynin, li çareyên hevalbendiya ferweranlyên dorê geriyan, lê

- 49 -

a

Ji hunera Mîtaniyan : pûlên madenî, 1.200 Berê Isa Nêrgiza Torî, KUrtlerde Sanat

- 50 -

mixabin ! Mîrên dorê, ji bo ku mafê xwe biparêzin, bi diyarî û pêşkêşan xwe avêt dest û piyên Fîrewnan !

Ji Mîtaniyan pêva, berî gişan Hitît, paşê jî gir û hûrên xwehermendên dorê, giş heta Qibris bixwe li ber Fîrewnan stuyên xwe xwar kirin û çekên xwe danîn.

SOSA TAR, Padîşahê Mîtan, berî her tiştî bi Asoran kariwer (meşxûl) bû. Jixwe Asor li bin ferman û ferweraniya wî bûn. Sosatar Asor kirin bin rêzaneke tekûz û bawermend. Lek (tabûr) ên ku ji Asoran berbihev anîbûn kirin bindestên fermandarên Kurd. Bi vî awayî, leşkerên asorî xistin bin rêzan, bin serfiruyê (îtaat) xwe (10).

Sosatar, gava ku bi vî awayî rewşa rohilatê navçeya xwe serrast û tekûz kir, ji bo ku bi Misriyan ra şer bike, ji wan ra yekdestî û hevalbendî pêşxwaz (teklîf) kir. Fîrewn Tûtrnêsê çarim pêşxwaza Sosarta pezirand. Herdu xwehermend bi aşîtî û xweşî li hev hatin. Sûriya Bakur ji Kurdan ra ma, Sûriya Nîvro bû ya Misriyan.
Paşê, Fîrewnê Misr. Tûtrnêsê çarim, xwest ku vê yekdestiyê dostanîtir û xurttir bike û bi padîşahê Mîtaniyan ra mervantî deyne. Tûtmêsê çarim, di 1405 B.M. da, bi neviya Sosarta, keça ARTAMA ra mêrjinî (zewac) kir. Ji vê mêrjint.iyê Fîrewn AM~MOFIsê sêyim hat cîhanê. Paşê, ev Fîrewn jî bi mîreke din a Kurdan ra mêrjinî kir. Navê mîrê JILI-H~PA bû. Ber bi dawiya jîna xwe mîreke din anî. Navê vê mîrê TADQ-H~PA ye. Ev şabanû NEFERTITI ye. Nefertîtî di dîrokan da nav û deng standiye. Fîrewn navê wê kiribû Nefertîtî. Iro li ser navê Ne fertîtî , li Misrê, kulukparsuyek (ehram)
heye. Di mirina wê da, ji bo wê ava kiribûn.
Zaf muxabin ! Ji van yekdestî û merivantiyan tu berxwedarî çê ne bû ! Bi gav û deman, Hitît pir xurt bûn. Mîtan û Hûriyan li ber leyiya Hitîtan
- 51 -
Tadû-Hêpa, yan Nefertîtî. Mîreke Mîtanî.
Jina Firewnê Misrê, Amênofîs III. Sedsala 14. Berî Îsa.
- 52 -
nikaribû bisekinin. Fîrewn ji Kurdan ra alîkarîke xurt ne dikir.
Mîtan êdî ber bi nişîv bûbûn. Ji aliyê din, Asor hişyar bûbûn, serê xwe bilind kir, şortş ji nav wan kêm ne dibû. Evçend malmîratî ne bes bû. Li Serayê Mîtan jî dolavgerî, entrîka Û hevdukuşt.in dest pê kiribû.
Dawiya dawîn. ji van bûyerên clgersuz xwehermenda çarsed salî ya Mîtanan, împaratoriya zorawer Û şehrevan a Kurdan ji meydanê rabû !
Di van deman da. ano di 1200B.M. da, cardin ji Sûbariyan ferweraniya NEHRJ nav û deng stand. Bermayên Mîtaniyan xwe gîhand Nehriyan.
FERWERANIYA NEHRY
Me nivîsandibû ku birrê mezin ê Araratiyan Sûbarî ne. Nehrî blrrekî Sûbarî ne. Pey Mîtanlyan, Nehrî ferweraniyeke din li Araratan serrast kir.

Nehrî di 1500 B.M. da, ji Araratan heya Torosan ferweriyekê saz kiribû û navê Nehrî ketibû dewsa navê Sûbari.
Rojhilatzan MAJERSON ji bo Nehriyan ewha dinivîsîne : "di sedsalên t5im û t2im B.M. da, eger em rind li heldorên Kurdistanê temaşa bikin, em dê bibînin ku Nehrî berî Madan hatine van heldoran". Q cardin Majerson dibêje : "Navçeya Nehriyan ne bitenê dora çemê Zab e. Padîşahê Asoran Tik lat Palazarê yekim Û neviyên wî dibêjin ku gelê ku li serê kaniyên Dîcle û Ferêt Û bakurê çiyayê Nîfast - Bedlîs, Diyarbekir, Xarpêt, Dêrsim - Û çiyayên Torosan ferweranî dikir .,;" "ev welatê Nehriyan e, di hengarna Iskenderê mezin da navê Kurdûwan standibû. Nehrî bapîrên Mad û Kurdên Îro ne".
Padîşahê Asoran TYKLAT PALAZARê yekim ku di 1128 B.M. da xuya bûbû şerine dijwar bi Nehriyan ra kirin, şerrên han di dîrokan da bi nav û deng in.

www.neewe.com
TYKLAT PALAZARê duyim di 1278 B.M. da împaratoriya Asor vejand. Ev padîşahê Asor jêhatîtir, dijwartir û binavûdengtirê Padîşahên Asor e. Di hengama xwe da, ji cihanê ra şahînşahiya xwe bang dabû, ji serkaniyên Dîcle û Ferêt heya dora Şamê xistibû bin destê xwe, daketibû kenarên Deryayê Sipî, Kurdistana bakurr di wan hengaman da ji Asor ra bac dida. Lê bi Nehriyan ra pişo-pişo dikir.
Dîrokzan ZAGO]IN dibêje : "bi Nehriyan ra xweş derbaskirina padîşahê Asor Tîklat Palazar tiştekî pir haykêş e. Hîç dudiliyan mekin, guhartina Tîklat Palazar ne ji dilpaqijiya wî ye, ew bitenê li benda kêys û fesala xwe ye".
Ev nivîsandina jorîn gezdika xurtî û tuwandariya Nehriyên zorbazû xweş nîşan dide. Şahînşahê cihan Tîklat Palazar ji Nehriyan ra pişo-pişo dikir !
Bermayên wan Nehriyên cengawer û ciwanmêr li dora Hekkarî heya îro bi zindeganî paydar in.
Padîşahê Asor TOKOLTY-NYNYB, di 890-884 da, bi Nehriyan ra şerine dijwar kirine. Gelek padîsahên Asoran bi van Nehriyên şerevan ra li meydana mêraniyê cengbazî kirine.

Di 740 B.M. da, Nehriyan ji bakurê rojhilat dirêjî Asor kir û ketin hundirê kişwerê Asor. Tîklat-Palazarê duyim bi zorê Nehrî ji sînorên xwe derxistin. Senexrîb ji vî şerî ra geştecenga (sefer) pêncim gotiye.
Nehrî, heya wendabûna Asor bi destê Medan, ji Asoran venegeriyane, tim bi Asoran ra şer û ceng kirine.
Pey wendabûna Asor di 612 B.Z. da, Nehrî jî tevî yekîtiya Mad bû. Nehrî bil perçeke imperatoriya Kurd.
- 54 -
FERWERANIY A M uşxt
Mûşkî jî, wekî Nehriyan, Kurdên Araratan in 0 Sûbarî ne. Dîrokên kevn nivîsandine ku Mûşkî B.M. bi 1100 sal 0 virda li Kurdistana bakur ferweranî kiriye, heya Kapadokya 0 Kîlîkya xistine bin destê xwe. Bajarê Mûşê ji Mûşklyan yadîgar maye. Tewratê navê MOş Maş nivîsandiye. Bi gotina Tewratê, Mûşkiyan li bakurê Mêzopotamya jî ferweranî kiriye.
Di van salan da, ji kolanên arkêolojîk hin kevnerêç (asar) ketine dest. Ji van kevnerêçan xuya dibe ku di 1800 B.M. da navê Padîşahê Lîdya Mîtayê Mûşkî bû, Di wan salan da, Mûşkiyan li Kapadokya 0 Lîdya hukumdarî dikir. Çawa ku Mûşkî 0 Mîtanî ji yek gel, ji yek hawiş in, Kurd 0 Sûbarî bûn, ewha jî yekdest 0 dost bûn.
Mûşklyan, di 770 B.M. da, bi Kurdên Araratan ra bûn yek, şerê Sargonê duyim, padîşahê Asor, kir.
Zanîbûna me li ser Mûşklyan ev çendik e. Em hêvîdar in ku ji nû da xebat 0 kolan 0 xepartinên din çêbibin 0 dîroka Mûşkiyan çêtir ronak bibe.
FERWERANIY A XAL TY
Xaltî jî, wek HOrî, Mîtanî, Nehrî 0 Mûşkî, Sûbarî ne, Kurdên Araratan in. Xaltî di 1500 B.M. da li Araratan 0 Kurdistana navîn fe rwe raniya Xaltî serrast kir. Ferweraniya Xaltî jêhatî, tawana, hişdar û cengawer bû. TOSPA WAN paytextê Xaltiyan bû.
Paş ku Xaltî li Araratan 0 li Kurdistana navîn bi cî bûn, pir ne çû baş xurt bûn, erdê xwe fireh kir, gihiştin Antî Torosan 0 milekî wan xwe gihand Deryayê Reş. Îro bixwe li Kurdistanê, li gelek ciyan, bermayên Xaltiyan hene.

Dîrokvanên rohilat 0 roava di Sobarîbûna Xaltiyan da yekdest 0 yekdeng in. Lê, vê rastiya eşkere Ahmet Refîq Beg, Dîrokzanê Tirk, napezirîne (qebûl
- 55 -
nake), ew nabêje erê. Ahmet Refîq Beg di nivîswara xwe ya dîrokê "BUyUk Tarihi Ilmuml" da, derpêç 1, rûpel 346, ewha dibêje : "Asorlyan ji vê heldorê ra ORARTO, Israîl jî ARARAT digot. Ermenî ku ji nejadê endo-ewrupayî ne, berî ku li van deran bi cî bibin, hawlşekî din li van doran rûdinişt. Navê vî hawişî Xaltî bû. Ev hawlş bermayê Hitîtan bû".
Ahmet Refîq Beg ji alîkî ji Xaltiyan ra bermayên Hitîtan dibêje, ji aliyê din jî pirsên Heredot (11), dîrokzanê yewnanî yê bi nav û deng, dipezlrîne û dinivîse : "Xaltî bejndirêj, ZÎnde, tendurust û xurt bûn".
Cardin ev Ahmet Refîq Beg di nivîs wara xwe da, derpêça yekim, rûpel 330, ewha dibêje: "rûçikê
Hitîtan ne dilkêş bû, bejna wan kin, hestiyên hinarokên ruyê wan derketî, lêvên wan ên jorîn daketî .:",
Gotinên dîrokzanê Tirkan hevdu nagirin ji alîkî ji Hitîtan ra bejnkin, Iêvdaket.î, rûçik ne xweşik dibêje, û paşê xwe ji bîr dike, ji bermayên Hitîtan ên Araratan ra bejndirêj, zînde, tendurust û xurt dibêje ! Ev nîşanên han li Hitîtan tên ? Tukes bi Hitîtên bejndirêj bihîstiye?
Dîrokzanên cihanê hemî Kurdbûna Xaltiyan pezirandine. Iro Xaltî li Kurdistanê hene û li Kurdistanê wek berê zînde û çalak dijîn. Lê dîrokbêjê tirk Ahmet Refîq Beg pirsa kurdî nikare bîne devê xwe ? Ev çi hlşkbawerî (taassub) e ? Ev çava serhişkî ye ? Ew bi Hitîtkirina Kurdan bitenê qîma xwe nayne, Ermeniyan jî tîne Araratan ! Li nştimanê Kurdan ê deh hezar salan bi cî dike ! Ya Ahmet Refîq Beg ! Dîrokzanên cihanê gişan nivîsandine û pezirandine ku Kurd berî Mîladê bi 6000 sal, dibe ku bi 8000, 9000 yan jî 10.000 sal, ji Iskandinavya hatine û li Araratan bi cî bûne.
Cardin wan dîrokzanan - hetta Ahmet Refîq Beg jî di nivîs wara "BUyUk Tarihi Umumi" da - nivîsandine ku Ermeniyan ji TRAKYA berî Mîladê bi 600 sal
- 56 -

koçû bar kiriye 0 derbasî Bosforê bAne 0 hatine Asya biçûk, li dora Qars 0 Eriwanê bi cî bûne.
Ahmet Refîq Beg di nivîswara xwe ya dîrokê da, derpêç I, rûpe l 34.7, dinivîsîne : "ber bi sedsala şeşim a berî Mîladê, Ermenî, ku ji nejadê endo-ewrupayî ne, gava ku tev Firîkyayê derbasî Asya biçûk bûne, hatine van heldoran, tevî hawişê Orarto bûne. Wuha ye. Pey sedsala şeşlm, kesên Orarto ji Xaltiyên kevn 0 ji Ermeniyan, ku ji roava hatine, çê bûne ..;".
Di van gotinên Ahmet Refîq Beg da yek pirs rast heye. Ev pirs jî hatina Ermeniyan li vî erdî Berî Mîladê bi 600 sal e. Pirsên mayîn, giş Ahmet Refîq Beg ji ber xwe gotiye, ano ne rast in, neyartiya Kurd in ! Ahmet Refîq Beg yekî bawerhişk e. Wî biryar stendiye ku pirsa "Kurd" ji nivîs waran derxîne. Lê ew wek me agah e 0 baş dizane rastî çawa ye : ew dizane ku Xaltî Kurd in. Ermeniyên ku ji rojava hatine tevî Xaltiyan ne bûne. Cardin ew dizane ku Xaltî îro li Kurdistanê hene 0 xurû Kurd in !
Ahmet Refîq Beg bi vî awayî bi kevirekî du çivîkan dikuje : 1- Xaltiyên Kurd dike Hitît, Kurdan pê qels dike. 2- Ermeniyan dureh dike, xwîna Ermenî û Hitîtan tevhev dike !
CTBÛNA ERMENIYAN LI ARARAT AN
Dema koçûbarbûna Ermeniyan ji Trakyayê, "Sît" - ku ji nejadê Kurd in - di wan salan da ji rohilat ber bi Kurdistanê hati bûn 0 ta Lîdya veklrandlbûn: wek leyiyek serejêr bûbûn ji jorê Deryayê Kaspîn, hin ciyên Qafqasan 0 Araratan, Gurcistan 0 ciyên ku Ermenî nû tê da bi cî bûbûn - Ermenî nû hat.lbûn, hêj Ermenistan çê ne bûbû -, Pont, Kapadokya dabûn ber xwe, dest pê kirtbûn Lydia jî bistînin. SÎt tu rêzan 0 rêdar (qanûn) nizanîbû, çaralî dabûn ber xwe, talan 0 wêran dikirin. Ermenî ku ji Trakya koçûbar kiri bûn 0 nû hatibûn van deran hê rind bi cî ne bûbûn, gund 0 bajar ava ne klrlbûn, kel 0
- 57 -
- 58 -
burc çê ne kiribûn. Loma ji bo Sîtan nêçîreke pir hêsan bûbûn.
Paşê hûn dê bixwînin, me di zûla Ermenî û Kurdan da ser vê çîrokê dûr û kûr nivîsiye.
FERWERANIY A ALAROD

Di nivîs warên dîrokan da, ji xwehermenda ALAROD ra ORARTO, ORARDO, ARARAT jî dibêjin. Xwehermenda Alarod, ano xwehermenda SQBARY. Ev xwehermenda ha bi gihandina hemî birrên Sûbariyan serrast bûye : Hûrî. Mîtanî, Nehrî, Mûşkî, Xaltî.

Li gel vî çendî. di nav van xwehermendan da, di wan demên dawîn ên navpêketî da, Nehrî û Xaltî bûn. Pir caran padîşahên Araratê ji xwe ra padîşahên Nehrî digot. Paytextê xwehermenda Alarodê bajarê Tospa-Wan bû.

Xwehermenda Alarod hergav bi xwehermenda Asor ra şer dikir. Di sala 829 berî Mîladê da, padîşahê Alarod, Mînwaş, nîvro û rohilatê Urmiyê vesend, hawişên Kurd ên Parsuwa û Mannaî, ku li van deran cî girtibûn, xistin bin parazta xwe û bi vî awayî bendeke xurt li hemberê Asoran tekûz kir.

Di 773 Berê Mîladê da, padîşahê Alarod, Sardorîsê yekim, bi padîşahê Asor Salmanazarê sêyim ra şer kir. Navê padîşahê Alarod ê paşîn Mina-Ari bû. Gava ku di sala 612 B.M. da Key Aksar Nînwa vekirand, hemî xwehermendên Kurdan kirin yek, Imperatoriya Mezin a Kurd serrast kir. Xwehermenda Alarod jî, wek xwehermendên din ên Kurdan, bi xwehermenda Mad ra bû yek.

- 59 -

Ji hunera Urartu : mixfera padîşah Sardûrî , Nêrgiza Torî. KUrtlerde sanat.

- 60 -

FERWERANIYtN KURD tN KASPIYtN MANNAI, MADt BIÇOK 0 MADt MEZIN

FERWERANIY A MANNAJ

Mannaî bixwe blrrekî ji Mad in. Ji kevn da, li dora Urmiyê bi cî bûne. Paytextê wan bajarê Urmiyê bA. Mannaî, Parsuwa, Klmrî 0 Sît gihîştibOn hev, ferwerlyek çê kiribA. Ew hawişên ku li dora Mannaiyan xwe dabû hev ji Mannaiyan ra pir bi kêr dihatin. Padîşahê Araratan Mînwaş bi wan ra yek dest bû. Di 829 B.M. da, padîşah Mînwaş şerê Salrnanazar, padîşahê Asor, kir, ew şikand 0 li "Geliyê şîn" ji bo yadîgara vî şerî stûnek daçikand.

Di nivîs warên dîrokan da navê 5 padîşahên Mannaî nivîsandine : ARTSARI, IRANZO, ARA, LOSUNA 0 DIAKU <DOGO). Diakû di 715 B.M. da bi padîşahê Asor Sargûn ra şer kir. Sît ku hevalbendên Dlakû bûn dereng hatin meydana şer, leşkerê Diakû loma şkest 0 Diakû dîl ket destê Asoran. Asoran ew dûrand (nefî kir>, şand aliyê Şamatê , Di wan salan da, bakurê SOriyê di destê Mîtaniyan da bû. Bi hêsanî, Diakû xwe gihand nav Mîtaniyan. Wan Dlakû şand 0 ew çû, gihîşt welatê xwe.

Ihsan NArî Paşa, Qehremanê Çiyayê Agirî, di nlvîswara xwe "Dîroka Rîşeî Nejad î Kurd" da, nivîsandiye ku Dlakû Key Kubbad bixwe ye. Lê, gelek nivîs warên dîrokan nivîsîne ku Key Kubbad ne Mannaî ye, Madî ye. Dlakû ferweranê Mannaiyan bû. Key Kubbad mîrekî Mad bA.

- 61 -

FERWERANIY A MAD~ BIÇÛK

Birrek ji Mad li "ATOPRATKA", ano li Azerbaycana îro, bi navê Madê Biçûk ferweraniyekê serrast kiriba. Di nivîs warên dîrokan da ji bo ferweraniya Madê Biçûk zanîneke aşkere 0. ronak tu neye. Madê Biçûk pey padîşahiya Key Kubbad xwe tevî imperatoriya Madê Mezin kiriye.

ŞEHRIY ARIY A MAD~ MEZIN FERWERANIY A KEY ANIY AN

Berî ku em dest pê bikin bişkartina (îzahat) xwehermenda Mad, em çend pirsan li ser Medan bibêjin. Mad. hê paştir Kurdên Kurtî, di wan salan da, ano ji hindikî 4000 sal B.M., erdê ku xist.ibû destê xwe pir fireh ba : ji sînorê Hindistanê heya Zagrosan, ji Urmiyê heya Deryayê Umman giş Madistan ba, kişwerê Kurdan ba.

Di nav vî erdî da Faris heban. Faris jî Arî ban, pismamên Kurdan bûn.

Hinek ji dîrokzanan gotine ku Kurtî ji aliyê Hindistanê hatine wan doran. Lê, baweriya pirtirên zanan û koş û xebata me ev e ku Kurtî, wek birayên xwe yên Kûtî, raste-rast ji Iskandinavyahatine çiyayê Agirî. Di koçbariya giştî da, ew berê hatine Çiyayê Agirî, paşê, ji bo peydakirina çêrgehên fireh, ji keriyên xwe yên giran 0. bê jimar berê xwe dane rohilatê, dora Deryayê Kaspînê û heya Deryayê Paris û Umman belav bane. Ev kişwer baye rûnişgeha Kurtiyan.

Ev hatina Kurtiyan ji Araratê 0. belavbûn 0. flrehbûna wan heya Ummanê hêdî bûye û bi sedsalan çê baye. Li gel vê yekê, hin rojhilatzan xwe

dispêrin nîşane û kevnerêçan, 0. gotine ku çend tîrên Medan (Kurtiyan) li bakur, li zozanên serê kaniyên Dicle a. Ferêt cî girtfbûne.

- 62 -

SAZMANIY A XWEHERMENDA MAD

Kev ne rêç Û nîşaneyên dîrokî ji me ra didin zanîn ku Mad berê Mîladê 4000 sal di navbera Kaspîn û Dicle da ferweranî kirine. Lê nivîs warên dîrokan hebûna ferweraniya Mad bi awakî vekirî di sala 2800 berî Mîladê da nîşan didin: 3700 B.M. da Kûtî. Akad wenda kiribû, lê di 2800 B.M. da ji nû da Akad bûn xudan zordarî û cengawerî, û bi alîkariya Asor êrîş bir ser Kûtiyan, welatê xwe ji destê wan derxist. Gava ku Akad serdestî li Kûtiyan kir. dest avêt ferweraniya Mad jî. Di navbera Akad û Mad da şerên dûr û . dirêj çê bûn. Li dawiyê leşkerê Mad şkest, Madistan jî ket bin lepê Akad. Mad bi salan ji Akad ra bac da. Bi vî awayî, cara bertir nav û pirsa ferweraniya Mad bi aşkaftî û pejilandî di sala 2800 B.M. hatiye bihîstin.

Cardin nivîs warên dîrokan nivîsîne ku di 2100 B.M. da di navbera padîşahê Asor, Nîne, û Mad da şerên dijwar bûne.

Ji van her du gertevan tê fehm kirin ku Kurdên Mad berî van sedsalan xwedî ferweranî û sazemendiyê bûn, ku di salên 2800 û 2100 B.M. karibûn bi ferweraniyên Asor û Akad ra şer bikin.

Gelo di hengamên kîjan padîşahên Mad da ev şer çê bûne? Navê pêşberê padîşahên Mad çi ye ? Ev padîşah di kîjan hengamî da ferweraniya Mad daniye ? Dîrok ji me ra bersîvên van tiştan nade. Dîroka Mad a wê hengamê di nav tarîtiyê da ye. Em hêvî bikin ku li hin deran nîşaneyên nû derkevin û di vî warî da me ronak tir bikin.

Ji 4000 heta 856 B.M., ano dema padîşahiya Key Kubbadê Kurd, ano ji 30 sedsalî bêtir ji Medan û ji gelên dora wan çi gertevên aşkaftî û ronak me berhev kirine, eva em dinivîsînin. Çawa ku em navê padîşahê yekim ê Mad nizanin, ewha jî em dema sazmendiya xwehermendiya Mad jî nizanin. Padîşahê bertir ê Mad ku Dîrok ji me ra gotiye Padîşah

- 63 -

Ohfonichtsskiz2':C 2: Dir sprllçbljçbt I~si,,,., li'CW Osltlll4lo1i,,,, K",JisIOll "'Ira" im r.JI.', Cbr.

Erliiutcruog: dick umrander die tauri5Ch-armenisch-kurdischcn Bergbndzoncn und die kurdiKh-lorischc (altmedisch-altpcrsisc:hc) Grenze.
Untcrbrocbenc Linicn deuren die mcderncn Lêndergrenzen an, • arnike Stidt~, 0 moderne Siadre.
- 64 -
TOSE ye. Nivîswarên Yewnaniyan ji Tose ra DIYO KES gotine. Di 1878 B.M. da, bajarê BELX paytextê Padîşah Tose ba.
SAZIMANIY A XWEHERMENDA ASOR
XURTBûNA PADIşAH KEY KUBBAD1: KURD Û WENDABûNA ASOR
Xwehermenda Asor di 2400 B.M. da sazemend ba, bi sedsalan di bin destê Mîtan da ma. Paşê Mîtan bi êrîşên bê dawî yên Hitîtan qels ket, Asor ji bin nîrê Mîtan reha bû, ji berêva bû xwehermendeke xurt Û zora wer. Çend sedsal şûnda bû şahînşahiyeke yekta û cihangîr.
Padîşahên Asor pir rencdar û xwînxwar û xwediyên ordiy eke mezin û rêzan ban. Ordiya Asor bi çekên bijare û tebûtên wê hengamê çekdar bû : bê jimar erebeyên ceng, lekên siwaran bi gurz, bi rim, bi şûr, bi tîr û kevan. Lekên peyan jî wek ên siwaran bi çek û rextan karûbar klribûn. Leşker lek bi lek parkirî bû : fermandarê her leşkerî cihê bû, her cengawer fermandarê xwe nas dikir. Fermandar gezdik bi gezdik bûn. Di nav wan da biçûk û mezin hebûn, Her yek ji mezinê xwe ra serfirû ba. Bi yek gotin leşkerên Asor wek leşkerên îro bûn : bedenbaz, çekbaz ji mezinê xwe ra serflrû ...
X wehermenda Mîtan 0 Mad û xwehermendên Kurd ku berî hînga me xwendibûn 2000 sal sîngên xwe dan ber vê ordiya zorawer 0 canbizar. 2000 sal şerkerê kurd zînê hespê xwe dananî, pişta xwe venekir, xencer û şûrê xwe ne kir kalê. Di van 2000 salan da xwîna Kurd wek leyiyan dişîçlkî (diherikî>. Qedxen 0 berxwedana Kurd, xurtiya Kurd, cengawerî û mêraniya Kurd ev ordiya Asor a fêris 0 zorbaz û zorawer hêdî hêdî, bi salan, bi sedsalan, êşand, birîn lê vekir, ji hev xist 0 paşê ew şikand û li dawiyê jî cihanê rakir û nabedîd kir!
- 65 -

Em vêya bêjin : ev kamwerî (serfirazî) bi Iêrasthatlnekê ne ketiye dest, bi fedakariyên mezin, bi ponjên mêrxas ên bîrbir û dûrbîn, bi merdî 0. xebatên bican û dil hatiye meydanê. Nemaza ji berî Mîladê 900 sal virde, di hengama Asor Nazîrbal 0. kurê wî Salmanzarê yekim da, Kurdistan di nav xwîn û agir da bO.. Di hengama her du Padîşahan da mezinayî û xurtiya Asor gihîştibû bilindtira gezdika xwe. Dawiya şer û cengên wan ne dihat.

Asor Kurdistana roava kiriba bin baca xwe, pênc caran êrîş biribûn Zagrosan. Kildanistan giş stand, walîkî asorî danî Babîlê. Elam û Paris jî ketin destên Asoran ...

Em werin dîroka Kurdên Kaspînê : gerdişên (hal) Kaspînan jî ji Klldan, Elam û Paris ne çêtir ban. Ji xwe di vê hengamê da Madistan seraser li mîriyên biçûk parkirî ban <12>' Ev mîriyên perakende li hemberê Asorên yekdest û yekxwehermend bê nerx û bê baha bûn.

Ji vê aşkaftina dûr 0. dirêj tê zanîn ku li Kurdistanê Asoran bê perwa hespên xwe dibezandin, dikuşt, talan dikir û Kurdistanê wêran dikir. Li meydanê, li hemberî vê xwehermenda zorbadzû 0. wêranker û herasawer (ditirsîne) bikaribe bisekine tukes tu nebû.

Diva bû ku lez bikin, bllezînln, ji vê gerdişa herasawer ra çarekê peyda bikin ! Eva ! Kurdê ciwanmêr ji vê gijokî û malmîratiyê ra çareya dawîn peyda kir :

Kurdên Kaspînê civiyan, mîr û rîsipî, bîrewer 0. kardîtî gihîştin hev, derdên dilsûz ji hev ra vekirin, dûr û dirêj peyivîn. Civîna wan dirêj kir, axaftinên hovnak û dilhejok bi rojan ajot. Berî gişî, diva bû ji nav mîran peyakî hêjatir bibijêrin û paşê vî prensê bijare ji xwe ra bikin Padîşah û bi sergedorî, ano bi dilpakî 0. bi fermanberî, li dora wî bicivin. Pey axaftinên pir dil hej û peyvine kûrûdûr, bi piraniya dengan mîr ARBAS, bi navê KEY KUBBAD~ KURD, Padîşah bang kir. Bi vî awayî Kurd ban xwediyên padîşahekî wek Key Kubbadê Kurd.

- 66 -

XWEHERMENDA KEY ANIY AN ŞEHRIY ARIY A KEY KUBBADÊ KURD

Key Kubbadê Kurd padîşahekî zana, dûrendîş, bedenxurt 0. rewanxurt, mêr 0. xebatker ba. Di 853 B.M. da, bi dengê gişkî yê Kurdên Kaspînê, li

textê şehriyariyê rûnişt, Berî hertiştî, wî merivên seguzeştger, tevhevîker 0. çepelkar ji meydanê rakirin. Gelê Kurd di bin fermandariya xwe da giş civand, rêdarên hêja rêzandin, di welatê xwe da dad 0. asayiş pêk anîn.
Paşê, bi van çareyên hişmendî 0. zîrekî Kurdistan seraser ba ava 0. gumreh, tuwanger 0. bextiyar. Key Kubbadê Kurd gava ev tiştên bingehî pêk dianîn, karê xwe yê leşkerî jî ji bîr ne kiriba. Dilxwaza wî ya mezin ev ba ku ordiyeke xurt, rapêçayî, karûbarkirî, bedenbaz, şûrhingêv 0. mertalgêr, tîravê] 0. gurzgerîn, lewend 0. kok 0. pir azmade, terube bîne meydanê, 0. bi vî awayî karibe li ber leşkerên zora wer ên Asor cengbazî bike, Asor bişkîne 0. tolên na 0. kevn bistîne.
Leşkerên kurd ji berê da cengawer, mêr, zorbazû, çalak, lewend, şerevan, karzane, bedenbaz 0. mertalgêr ban. Lê sazemendî 0. rêzana ordiya kurd wek Asor tekûz 0. tebat ne ba. Key Kubbadê Kurd ev pitika qels fehim kiriba. Loma wî dest pê kir sazemendiya ordiya xwe. Berî hertiştî, rahişt vê pitika qels. Armanca wî serrastkirina ordiyeke saz 0. tekûz ba. Diva ba bi şerevaniya leşkerê kurd rêzan 0. bend 0. best (dîsîplîn) jî tevê bibe. Ano, Kurd çawa şerker e, ewçend jî divê rêzvan, tekûz, tebat 0. bi dîsîplîn bibe. Key Kubbadê Kurd zanibû kîjan roj karibe ordiy eke bi dîsîplîn, bi rêzan 0. bedenbaz 0. bindestên serdarên pirspor cengbaz bîne meydanê, wê rojê ew dê bigihîje armanca xwe. Wê gavê, ji padîsahên Asor ên zorba 0. rencdar êdî pax nake.
Key Kubbadê Kurd bi vê projeyê bi salan koşiya. Ordiya wî ji sê blrrên bingehî saz diba : 1- Lekên gerdûneceng, 11- Lekên siwaran. III- Lekên peyan.
- 67 -
.c. a;.
'" .. ... '"
I I I I
I
tU /
'" 1 ::t I
?f!;/
ol ~ tu 1'" ,.-,~

, ~
: ~
,
\ _-.t.
,----- "
\
\
,
\
\
\
\ \
" ~
\
,
0), ,'"
" oC:. ~--
j ,(0 i ~ 'eP -o
Z E :~ "0
o ,----",.s ~J ~ /'
r' \0 " 0 e
\ : ~
C---' .••
,_ ..... ") i:~
) ..... __ ::::.a.y"-
- 68 -
Lekên siwar 0. peyan jî bi birran beşkirî ban birrên tîravêjan, ên gurzan, ên riman, ên şar 0. mertalan, ên kemendavêjan, ên kevirkaniyan.
Key K ubbadê Kurd ev ordiya xwe spart destên fermandarên karzane, hunerwerên şeran 0. şebxûnan, cengawerên rojên giran 0. meydanên mêran!
Key Kubbadê Kurd, gava bi van karûkoşan : şehrevanî, bazirganî. dadkerî kariwer diba. xebata balyozî (*) 0. konevaniyê (*) jî ji bîr ne kiriba. Berî

her tiştî. veşartî. ji bin de. bi waliyê Babîlê ra yekdestiyê danî. Paşê, Elam jî xiste .nav vê yekdestiyê. Jixwe, bi rûnişt.lna Key Kubbadê Kurd li ser textê Mad, Paris ketibû bin destê ferweraniya Mad.
Key Kubbadê Kurd ev karên evçend giran di 88 salan da anîn Meydanê ! Belê, Kubbadê yekta, Padîşahê Mezin. 120 sal temen kir ! 94 sal Tacidarî kir!
Berê paytextê Medan bajarê Tesfûn ba. Paşê. ji bo ku welatê xwe çêtir bike, ji Asoran biparêze, Hemedan kire paytextê xwe.
Kubbadê pîr gava van karûbarên giran bire serî, da pêşiya ordiya xwe ya ciwan 0. 400.000 cengawerên Kurdan riya Asoran girt. Babîlî, Paris 0. Elam ku yekdestên Mad ban. wan jî xwe tevê ordiya Kurdan kir.
Gava padîşahê Asor , Sardanapal, vê peyamê stand, bi ordiya xwe gişî derket derveyê bajarê Nînwa.
Her du ordî jî li hemberî hev rêzana cengê girt. Her du alî jî êrîşine dijwar dikirin. Her du alî jî di mêranî 0. hunerbaziyê da kêmanî ne dikir. Şerên xwînrêj pênc roj ajot. Lê, li paşiyê, ordiya Asor a giran 0. xwînvexwar, ordiya du hezarsale şkest. Asor ji neçarî ji meydana cengê vekişiya, xwe avêt paş bedenên Ninwayê.
Leşkerê Kurdran, teva leşkerên hevalbendan, Nînwa dorpêç kir. Dorpêçiya ha du sal ajot. Sala sisiyan,
- 69 -
dema buharê, ava çemê Dicle û çend têkilên wî rabûbûn. Dorpêçkeran bend çê kirin, cuh vedan, ava Dicle û çemên din bi aliyê bedenê Nînwa berda. Bedenê Nînwa nikaribû li ser leyiyê çeman ber xwe bide. Cî cî, dîwarên beden herifîn û hilweşiyan.
Padîşahê Asor, Sardanapal, li ber vê gerteva cangizok (fecî) û malwêraniyê bicarek bê umîd bû û, ji pirxunî, xwe tevî jin û zaruyên xwe, bi hemî fermandar û karweş û beniyan, bi rext û çekên giranbûha, kenzên gewher û almas û mirarlyan ket serayekê û agir berda seraya xwe û gişkî merivên xwe, mal û kenzên xwe şewitandin.
Kurd, Kildan, Paris û Elam, hetta enzanên cihanê giş, ji van padîşahên xwînxwar û zordar reha bûn. Key Kubbadê Kurd di 759 B.M. da, rewanê

(*) xwe yê pak da Homan (Xwedê), 120 sal temen kir, 94 sal bi ferweranî û serfirazî şehriyarî kir.
Key Kubbadê Kurd gava mir 5 kurên wî hebûn :
Key Kawus, Keyapû, Key Ariş, Key Armîn, Key Pasîn.
ŞEHRIY ARIY A KEY KA WUS
Di 759 B.M. da, kurê Key Kubbadê Kurd, Key Kawus, li textê Mad rûnişt. Key Kawus bilindkesekî pir noûmêr bû. Berê geşte cenga Hindistanê çê kir, ji Hindistanê gelek ciyan vesendin. Paşê, ber bi Hamawranê (Yemen) liviya. Pey gelek ceng û şeran, bi padîşahê Yemenê, Zu-EI Azar, ra aşîtiyê danî, bi keça wî, Sudaba, ra mêrjinî kir. Paş çendakî, bi kara giranbuha Sudaba anî û vegeriya Kurdistanê. Key Kawus 44 sal bi berxurdarî û mezinayî şehriyariyê ajot. Di 725 B.M. da giha dilovaniya Xwedê.
PEY MIRINA KEY KA WUS
Key Kawus warwenda mir. Ji bo bijartina padîşahê

Ji hunera Medan: traşkêşî li ser zinaran, li Çiyayê Zagros. Selaheddîn Mihotulî, Arya Uygarhklarmdan KUrtlere.

nû, li navbera gel serêşaniyên mezin çê bûn : du mîr dilxwaziya padîşahiyê kir. Her du jî ji malbata Key Kubbad bûn. Yek ji wan Mîr Tos bû û yê din jî Mîr Lehrasep bû. Mîr Tos ji padîşahiyê ra hêjatir bû: dûrbîn, karzana 0 xebatker bû. Li ba Lehrasep ev nav û nîşan tu nebûn, lê ji aliyê mîratxuriyê Lehrasep kirasekî nêzîktir bû 0 zavayê Key Kawus bû.
Têkoşîna bijartina Şahane gelekî dirêj kir. Li dawiyê, bîrewer û rîsipiyan ji vê karbenda dilgivêş ra çare ke munasib peyda kir : Lehrasep bajarê Belx ji xwe ra dê bike Paytext û li heldora Belxê ew dê ferweranî bike. Tos jî Hemedanê ji xwe ra dê bike Paytext 0 dê bibe ferweranê gişî Kurdistanê.
PADIşAHIY A KEY ANIY~N HEMEDAN~ ŞEHRIY ARIY A KEY TOS
Key Tos di 715 B.M. da li textê Medan rûnişt. 60 sal bi tuwandarî, bîrewerî û mezinayî şehriyariyê ajot. Di wan deman da firehiya Kurdistanê ji sînorê Hindistanê digihîşt heya Deryayê Reş, ji Deryayê Kaspînê heya kenarên Deryayê Ummanê.

Dilxwaza mezin a Key Tos ev bû ku di vî kişwerê xwe yê fireh da bi dad 0 asayiş û aşîtî padîşahî bike. Ji bo vê yekê, rêdar (qanûn), rêzan (nizam) û bernameyên (program) hêja danîn. Ji bo dîwana Padîşah ketina hundir, navesazekê (talîmat) ji bo rûniştin, rabûn, peyvîn danî.
Konevaniya Key Tos a balyozî pir bi hoşmendî bû. Key Tos aştîperweriya ku nîşanê xwehermendên hevsiyên xwe dikir heya wê gavê padîşahên din ne kiribû. Key Tos tucar dirêjî hevsiyên xwe ne dikir. X wehermendên dorê jî ordiya Key Tos a xurt û rapêçayî û hergav amade ji ber çavên xwe dûr ne dikir.
Key Tos bajarê Tos , ano Xorasana îro, ava kir.
- 72 -
Bajarine din jî perdax kirin Û xemilandin. Nemaza, ji paytextê xwe Hemedan ra pir emek dabû.
Semîramîs, Şehbanuya Asor, Hemedan ava kiribû. Paşê Key Kubbadê Kurd Hemedan xemiland û fireh kir. Key Kawus jî di hengama xwe da guh dabû Hemedanê, kolan û şeqam vekiribûn, serayine zîwer û bedew ava kiribûn. Lê Key Tos di bajarvaniyê da peşiyen xwe şûnda hiştibûn meydanên fireh vekirin, bi baxçe û gulistanên dilrevîn xemilandin, bajar fireh kir, kele û beden serrast kirin, serayine bêheval tê da ava kirin. Bi gel vana, dora paytextê fêris bi heft bedenan dorpêç kir. Ev heft beden nîşana heft birrên Kurtiyan bûn. Rengê her bedenekî cihê bû. Bedenê şeşim zîvreng bû, bedenê hef tim rengzêr bû (13).
Di hengama Key Tos da, Kurdistan ava û Kurd gumreh û geş bûn. Di nav aştî û asûdegiyê da, çandvanî, pêşwerî û bazirganî gellek bişkivî bûn, pêşve çûbûn. Di van salan da, tuwangerî û dastê kurd ku ji keriyên terşên xwe didan hev bê jimar bûn. Di van deman da, Kurd xwediyên hezaran keriyên hesp û pez û çêlek bûn. Her sal bermayên terşên xwe difrotin hernsiyên xwe. Ji hezaran salan ve, hespên Kurdan di nav Akad, Sûmîr, Elam, Kildan û Asor da bi nav û deng bûn. Kurd her sal têra xwe ji çêttrên hespan ji xwe ra dihiştin, ên mayîn difrotin xwehermendên hemsî yên xwe. Klrîndarê meztir ê Kurdan Asor bû.
Gotina dawîn : Key Tos yek ji mezinên padîşahên Kurdan bû. Di hengama şehriyariya xwe da navê Kurdistanê gihandibû perê azmanan. Şahînşahê

mezin Key Tos di 655 B.M. da gelê kurd purxun û pirgirîn hişt û çû ! Rewangehê wî ronak û rewanê wî şah be !

ŞAHÎNŞAHIY A KEY FERIBREZ

Key Ferîbrez, kurê Key Tos, di 600 B.M. da li

- 73 -

Ji hunera Medan : taseke zêrîn. Sedsala 7mîn Berê Isa. Nêrgiza Torî, KUrt1erde sanat.

- 74 -

textê Kurdistanê rûnişt. Ev padîşah jî padîşahekî bi nav 0. deng, pir dadker 0. hoşimend ba. Di hengama wî da sînorên Kurdistanê (Kurdistana Kaspîn) li rohilatê gihîştfbûn çemê Ceyhanê 0. Hindistanê, li roava gihîşt.ibûn Mêzopotamya 0. Torosan. Lîdya, Kîlîkya 0. Fînîkya bac didan Kurdan. Ibran 0. Misr bi Kurdan ra yekdestî girêdabû 0. ketibûn bin parastina wan.

Key Perîbrez ji ordiya xwe ra ji dil 0. can guhdar ba. Bajarê Hemedanê, paytextê wî, hîn çêtir xemilandiba. Sernîveka ola Zerdeşt li Bajarê Belx, ano Hemedan, ba.

Vê paşiyê Asor ji na da serê xwe bilind klrlbû. Key Ferîbrez dixwest ku wek kalê xwe Key Kubbad Asor şerde bike, bi ordîke mezin ço. ser Asoran. Bext ji Kurdan ra neba yawer. Ev padîşahê pehlewan di meydana serfirazî 0. mêraniyê da bû goriyê Kurdistanê. 625 B.M.

ŞEHRIY ARIY A KEY AKSAR

Di meydana mêraniyê da, kuştina Key Ferîbrez hindik maba bobelateke mezin bîne serê gelê kurd.

Nêzîkî 2000 sal, Kurd bi şilfaxencera xwe, bi penc 0. neynûkên xwe êrîşa Asoran şikand 0. gihîşt serxwebûna xwe. Bi sedhezaran canbêzar, pêşmergeyên kurd, di vê meydana pehlewanî 0. mêraniyê da xwe kir goriyên Kurdistanê.

Kurd du 2000 sal pêsîr bi pêsîr, gewrî bi gewrî, cengbazî, şerevanî kir. Kurd wek çeman xwîn rijand 0. paşê Kurdistanê ji destê Asorên zorba stend. Ev Kurdistana ev çend giranbeha dikira cardin ji dest biçûya ! Kurd careke din jî bibûya dîl 0. belengaz, girtiyê destê Asor !

Baş ba ku rîslpiyan, camêrlne dûrbîn 0. karaşîna, zo. bi za xwe gihand Key Aksar, kurê Key Ferîbrezê ronakrewan, 0. ew kir padîşah. li textê Madan
- 75 -
rûniştand. Ew karazmûdeyên niştlmanparêz li dora padîşahê xwe yê cuwan civiyan û wek hengama bavê wî, ji dil û can, bi rastî û camêrî ji fermana wî ra serfirû bûn.
Key Aksar di 625 B.M. da tacê Keyan danî serê xwe û bû padîşahê Madistanê. Key Aksar bi yek endîşe rûdinişt û radibû, ku bi şev û rOJ JI bîr û hoşê wî dernediket. Bi tenê ev endîşe bû : çawa tola bavê xwe ji Asor bistîne !
Lê, ev tola serfiraz bi ah û fîganan, bi gazin û girînan ne dihat standin. Standina vê tola giran û cangudaz ne hêsan bû. Ev karekî giran û dijwar bû. Rakirina vê tolê girêdayî gelek tiştan bû : hoşmendî, pojnên karsaziyên giranber, canbêzariyên cuwanmerdan, koş û xebatên ji dil û can.
Çawa ku Key Aksar giranberiya vê tolstandinê baş bîr dibir, gewremerdên emekdar, serleşker û fermandaran, heya giş ordî û gel giranberiya vê tolhildanê bîr dibir.
Gava ku di 625 B.M. da Key Aksar bû padîşah, tevgera Madistanê wuha bû : ordiya gel, biçûk û mezin, yekgotin bû, can û mal, hertiştî dabû ber çavên xwe ! Diva bû Asor careke din jî pê li welatê wan neke. Dê Kurdistan heya roja piştdawiyê serazad bibe ! Bi serxwe be !
Padîşahê ciwan jî vê dilgermiya giştî bi awakî hêja û bi merdî bersivand : tavil dest bi karûkoşên konevanî û leşkerî kirin. Gel, bi gişî, yekdest û yekdeng bû. Di vî karûbarî da, tu tiştekî dirix ne kir. Ordiya Key Aksar çi dlva, gel xwe bi şûnda ne girt : çek û rext, zêr û zîv, mal û can ... Gelê kurd tiştine nedîtî anîn meydanê. Key Aksar di demeke hindik da ordiyeke giran berbihev anî. Ordiya Key Aksar di kok û rêzaniyê da, bedenbazî û hunerweriyê da, ji ordiya Asor bi gelekî buhart.
Ji bo ku em zanibin Key Aksar xebata xwe çi çend bire serî, ordiya xwe çiçend tebût û tekûz kir, em
- 76 -

Ji hunera Medan: xemla cil li Hemedanê (paytexta Medan), du şêr di nav gilovereke ji tayê zêrîn. Sedsala Smîn Berê Isa. Nêrgiza Torî, KUrtlerde sanat.

- 77 -

van rezen jêrîn ji nivîs warên du dîrokzanan distînin û dinivîsînin :

Tarîxa Merdûx, derpêç 1, rûpel 175 : "Siwarên Kurd ên rêzanî di hunerweriyê da ji siwarên Asor pêşvetir bûn, çima ku siwarên Kurdan di bezê da 0 di êrîşê da bi hunerbazîke mezin tîravêjiyê dikir. Û yek jî, hespên Kurdan di bedewbûn 0 bez 0 çalakiyê da li cihanê gişî naskirî bûn".

Tarîxa Ibrahîm Heqqî, derpêç 1, rûpel 120 : "Key Aksar, ji bo ku karibe kişwersendiyê bike, bi bingehî rahişte kar 0 xebatê : Key Aksar leşkerê xwe pir baş rêz and 0 kok kir. Ji bo her çekî lekên cihê durust kirin. Ji bo her birrî fermandarên cihê danîn. Bi vî awayî, xwehermenda Mîdya ku mêraniya gelê wî ji berê da naskirî ye, di ser da jî bû xwediyê ordîke rêzan 0 tekûz".

Key Aksar, gava bi ordiya xwe evçend bi giranberî kariwer dlbû, li meydana konevaniyê jî ji xebata xwe şûnda ne dima: ji ferweranê Babîl, Nabopalasar, ra şandî birêkirin. Xuya kir ku dîtinên Babil 0 Hemedanê weke hev bûn. Di navbera herdu xwe hermendan da bi parêzî 0 êrîşî yekdestî çê kir. Ji bo ku vê yekdestiya xwe çêtir 0 xurtir bikin, Key Aksar keça xwe da Boxoto-Nesir, kurê NaboPalasar, ferweranê Babîlê.

WENDABÛNA ASOR

Gava Key Aksar kar 0 koşên xwe yên leşkerî û konevanî bire serî, ordiya Babîl tevî ordiya xwe ya giran kir 0 ajot ser Asor. Di navbera her du ordiyan da çend roj şerine xwînrêj 0 dijwar çê bûn û di dawiyê da ordiya Asor şkest 0 xwe avête paş bedenên Nînwayê. Ordiyên Mad 0 Kildan Nînwayê dorpêç kir. Di vê navê da, Key Aksar peyxamek stend ku Sîtan dirêjî Kurdistana bakur kirine 0 ji berêva pêş ve tên (14),

- 78 -

SÎT ku Arî ne 0. ku birrekî Kurd in, ji Qafqas dest pê kirine, Kurdistan, Gurcistan, Ermenistan, Kapadokya 0. Lîdya dane ber xwe, gihîştine Deryayê Sipî.

Key Aksar dest ji dorpêça Nînwayê berda 0. Ço. Kurdistana bakur, alîkariya Kurdên Ararartî. Wî bi Sîtan ra cengine dijwar kirin. Lê, kir-ne kir, Sît giş ne karibû ji Kurdistanê derîne. Key Aksar bi salan derdên Sîtan kişandin. Li dawiyê, şevekê, wî serger-deyên Sîtan kire mêvanên xwe. Ji her celebî xwarin, mêze 0. meyên şahane danîn ber wan. Sergerdeyên Sîtan Key Aksar pir dilxweş ban 0. ji wan xwarin 0. vexwarinên şahane gelek xwarin 0. vexwarin. Giş serxweş 0. bêhiş ban, wek miriyan ketin 0. veketin. Key Aksar ferman kir merivên xwe ku serên wan gişan jêbikin. Sîtên mayîn jî ji Kurdistanê qewirandin 0. ji van çepelan pak ba.

Ji bo şahiya vê kamweriyê, heya îro, li Kurdistanê. di 31 Tebaxê da cêjna Agirdadanê çê dikin. Ji vê cêjnê ra "Cêjna Tolhildanê" yan jî "Cêjna Kurd" dibêjîn.

Gava ku ev gertev çê diban, Şaraku-Sarakus baba padîşahê Asoran 0. keysa xwe lî Babîlê anî ba, çima ku ordiya Mad bi Sîtan ra şer dikir. Şaraku dikira Babil ji na da bistîne. Lê gava ku Key Aksar ji serêşaniyên Sîtan wareste ba, za bi za Ço. alîkariya dost 0. yekdestê xwe Nabo-Palasar. Ordiya Babil tevî ordiya xwe kir 0. di bin fermandariya xwe da dirêjî Asor kir.

Asor ji bo rehayiya xwe yek çare dît : xwe bavêje paş bedenên Nînwayê. Ordiya yekdestan Nînwa dorpêç kir. Dorpêçî pir ne ajot. Ordî beden cî cî qul kirin 0. herifandin. Padîşahê Asor Şaraku umîda rehabûnê birrî 0. wek pêşiyê xwe Sardanapal kete serayekê, xwe 0. jin 0. zarokên xwe tevde şewitandin.

Xwehermenda Asor a dijwar li ber bînfirehî 0. berpêdarî 0. zoraweriya cengawerên kurd ji bingeha xwe hilweşiya 0. nabedîd ba 0. di 612 B.M. çû.

- 79 -

Ji hunera Sîtan : Xezaleke zêrîn, sedsala 7-6 Berê Isa

L'Or des Scytes, Muzeya Qralî ya Huner û Dîrokê, Bruksel

- 80 -

Piştî ku xwehermenda Asor herifî 0. wenda bû, Mad û Babîl yekdestiya xwe ji hev ne xist, çêtir û xurtir kir.

Pey vê serve birina giran û dîrokî, Kurd tevde li hev civiyan, xwehermendeke yekta çê kir. Kurdên Araratan gihîştin Kurdên Kaspînan. Kurd giş, Katî 0. Kurtî, navê Mad an navê Kurd stand. Ew imperatoriya dijwar 0. no. bO. imperatoriya Kurdistan, an imperatoriya Madistan. Ji xwe ji bo vê yekê Tarîxa Merdûx pir caran nivîsiye : "Em dikarin li ciyê Kurd Mad bêjin, wusa jî em dikarin li ciyê Mad Kurd bêjin. Kurd Mad e, Mad jî Kurd e. Ji bo vêya tu gûman naxwaze". Em jî vê ponjê rast û li cî dibînin 0. carna Kurd û carna Mad dinivîsînin. Dîroknasên rohilat û roava giş ji vê rastiyê ra erê gotine: Mad Kurd e, Kurd jî Mad e. Çawa ku Madistan Kurdistan e, Kurdistan jî Madistan e.

0
<>
0 •••
<> .•..•
c> •...
c> '"
,..; 0
.,..
...• .•.
- •...
• ••
Z a
~ ••
• .. It\
Il. ~

Nexşeya E. Cemîl Paşa, N° 4 : sala 612 Berê Isa. Imperatoriya Mad "yan Med" û hilweşana Asor.

FIREHKIRINA IMPERA TORIY A KURD

Kurdên wan sedsalan jî vê rastiye bîr kir. Loma, Kurdên KOtî 0 Kurtî tev bi hev ra li dora padîşahê xwe Key Aksar civiyan. Bi mejika wan hengaman Kurd dest bi firehkirina kişwerê xwe kir.

Kurdan Sît ji Ermenistan û Kapadokya qewirandin û derxistin. Ev her du kişwer bi ser Kurdistanê ve berdan. Bi vî awayî sînorên Kurdistanê gihîştin çemê Halis (Kizil Irmaq).
Gava Key Aksar Sît ji welatê xwe derxistin, hin serekên Sîtan bûbûn penahvêjên (dexl) padîşahê Lîdyayê, Aliyat. Key Aksar ev bextekiyên Aliyat jê xwestin. lê Aliyat xwestina wî bi cî ne anî. Key Aksar bang li ceng kir, bi leşkerine pir ajot ser Lîdyayê. Lîdiyan bi mêranî bi Madan ra şer kir. Her du alî jî şerevanên hêja bûn, yek bi yekê din nikaribû. Şerên wan şeş sal dirêj kir, paşê di sala heftan da, rojekê. di germayiya cengê da, ro hate girtin, ruyê ezmên reş û tarî bû. Girtina rojê nîşaneke ne qenc bû. Ev şer ne dilxwaza Xwedê bû. Loma, her du ordî ji hev vekişiyan, dev ji şer berda. Padîşahê Babi1, Boxoto-Nesir, di navbera xwehermendan da rûnişt, her du xwehermend li hev anîn. Çemê Halis bû sînorê wan. Ji bo ku aştî 0 dostaniya xwe xurtir bikin, padîşahê Lîdya keça xwe Artînî da kurê padîşahê kurd.
Pey van şeran, xwehermenda Kurdistan bû mezintira xwehermendên wê sedsalê. Hêrodot, dîroknasê yewnanî yê bi nav û deng, sînorên Kurdistanê yên

wê gavê weha nîşan dide: li rohilat Çemê Ceyhûn (Arnoya): li roava Çemê Halis; li bakur Deryayê Kaspîn , Çemê Aras, Çiyayê Araratan, Deryayê Reş; li nîvro Deryayê Paris (Faris), Deryayê Umman.
Çawa ku paşê em dê bibînin, Kurd ji van sînorên ku Hêrodot nehrevanî dike wêdatir jî çûne, Misr standiye, ji Hebeş 0. Yemen 0. Hind ra geşteceng kirine. Kurd di dîroka cihanê da lîzine mezin lîstine. Îro bixwe, li welatê xwe yê kevnare da bi gilorkî dijîn 0. jimara wan jî gelek e. Li gel vê yekê, nivîswarên dîrokan li ser Kurdan kêm caran dinivîsin. Ji hin dîroknas 0. rojhilatzan pê ve, hayê kesî ji Kurdan tu neye. Em dixwazin engîza vê guhnedanî 0. nenêrtiniyê bi çend pirsan bidin zanîn : Key Kubbadê Kurd di 853 B.M. da ba padîşahê Mad. 94 sal li textê Kurdistanê şehriyarî ajot ! Welatê xwe ji keşrnekeşî 0. bê ferûtabiyê reha kir 0. xwehermen-deke mezin serrast kir, ji tunebûnê ordiyeke dijwar deranî, ordiyên Asor kişandin, Kurd ban serazad 0. serbixwe.

Padîşahên kurd ku di pey ra hatin şopa Key Kubbad ajot, Kurdistan ava kir, jîndar kir.
Asor ku cardin serê xwe raklrlbû, Key Aksar ew wenda kir, Nînwa bi axê ra kire yek. Babîl, Israîl, Kurdistan, hetta cihan giş ji destên padîşahên Asor ên zorba 0. xwînrêj reha kirin.
Key Aksar Kurdistaneke yekdest, gumreh, geş, xurt 0. bextiyar serrast kir 0. di 584 B.M. da temenpayan ba. Key Kubbadê Kurd 0. paşhatiyên wî heya temenpayaniya Key Aksar 269 sal di împeratoriya Kurdistan a mezin 0. fireh da, ku sînorên wê ji Hindistanê ta Deryayê Reş, ji Araratan ta Deryayê Ummanê digihîştin, bi serwerî 0. bîrewerî şehriyarî ajot.
Pir muxabin ! Ji van gertevên dîrokî yên Kurdan, kesên agah gellek kêm in. Di gel vê yekê, dîrokzanên Yewnan, Asor, Kildan, Îran 0. yên diger gelan, ji van gertevan ra nehrevanî kirine. Rojhilatzanên

Awropî jî di nivîswarên xwe da ji van gertevên Kurdan ên bilind û dengîn qisse kirine.
Gelo çima ji dîroka kurdî herkes agah ne baye ? Em dixwazin bersîva vê pirsa han bi kurtî bidin zanîn. Padîşahên Kurdan, wek neviyên xwe yên îro, merrvme zîravpaye ban, mîna padîşahên Akad, Sumîr, Kildan, Asor, Hitît, Misr ... xwe ne dipesinand, payesuturî hez ne dikir. Loma, şikandinên dijminan, karkirinên şeran û cengan, stendinên kişwer û bajaran, şehrevanî û hunermendiyên xwe, dadkerî û dilovanî ku li bin destan re dikirin, [înên xwe yên hezaran sal ku bi mezinatî, bi serfirazî, bi paydarî derbas dikirin li ser kevir û zinaran, li ser çerm û qermîtan ne nivîsandin, stûnên şadimanî daneçikandin, pût û nîgar ne terişandin, şahînşahî û mezinatiyên xwe bi çar alî bang û qêr ne kirin. Ew li xwe bawer ban, mêr ban. Ew rastgo û dilpaqij û dilovan ban ...
Ma evçend bilindayî û serfirazî ne bes e ? Deng û qêr û gazin ji çira ye ? Mezinatiya kerr û lal ne xweştir e ? Belê, ev mezinatiya kerr û lal tiştekî pir xweş e, lê konevaniyeke çewt e. Paş hatî û neviyên wan şahînşahan, wan box û beranan ji vê konevaniya çewt îro ziyanên dijwar dibînin. Belê, payenexwazî (tewazu') tiştekî xweş e, lê pirtirî (lfrat) hergav malwêraniya mezin tîne pêşiya meriv.

Bavpîrên Kurdên îro Katî, Kurtî, Lolo, Kasî, Sûbarî, Harî, Mîtanî, Nehrî, Mûşkî, Xaltî, Alarod, Mannaî, Anzanî ... Paşê jî Mad li xwe daniyana, wek ên hemsiyên xwe : Misr, Hitît, Asor, Kildan, çend perçe kevir daçikandana, neviyên wan, Kurdên îro, evçend belengaz û malwenda ne diban, hebana wan, şehrevaniya wan, zimanên wan ne dihatin şerandin <inkar kirin) : "bi navê Kurd gelek tune ! Zimanê kurdî ne tu ziman e ! Kurd çi gavê ferweraniyekê saz kiriye ? Kurd Tirkê çiyayî ye ! Kurd çenge ke kûvî, rêbir û diz in ! ... ". Gotinên ewha ne diban devgerkên nezan û kindaran û Kurd bi sedsalan

- 85 -

ne dibûn armanca kirêtiyê û bi sedsalan bindestên zordaran û bêbad û xwînrijan, ne diêşiyan. ne dinaliyan.

Di van salan da Tirkan, bê şerm û fedîkarî, ji ber xwe gotinekê derxistine. Goya Kurd Tirkên çiyayî ne !! Gelo bi wijdan bêjin, ma Kurd bitenê li çiyan dijîn ? Li deştan, li bajaran, li gundan ma najîn ? Ji hezaran salan da gund û bajar ava ne kirine ? Kilîs, Xozat, Erzerom, Xarpêt, Amed ... Mûş, Wan, Bedlîs ... Amedî, Hevlêr ... Medayin, Kermanşah, Nehawend. Hemedan ... Rey. Qezwîn. Isfahan, Belx, berê ne bajarên Kurdan bûn ? Dibe ku van bajaran cenabê Tirk bi koçbariyên Qayxaniyan, bi xwe ra ji Tirklstanê anîn !!

Li Tirkiyê. li bajarên Bayezîd, Erdehan, Qars. Erzerom. Ezirgan, Dêrsim, Melete, Meraş, Entab, Ruha, Mêrdîn. Hekarî. Wan. Bedlîs, Sêrt, Amed, Mûş, Bîhngul, Xarpêt, Maden, gelo ne Kurd in ? Ev bîst satrap (wilayet) bi sernîvek (merkez) û qeza û gundên xwe va ne rûniştgehên Kurdan in ?

Ev milyonan kes ma ne Kurd in ? Japon in ? Alman in ? An Tatar in ? Ji van bîst satrapan pêve. Kurdên ku li pênc qezayên Sêwazê - Kangal, Gurun, Suşehir, Zara, Koçgirî - û li satrapa Ankara - Konya, Kayserî, Adana. Iskenderûn - û di satrapên din ên Tirkan da bi piranî û gilorî rûnlştgeh girtine ma ne Kurd in ? Lê çi ne ? Qey Tirkên çiyayî ne ?

Ey kargerînên Tirk, Ereb û Ecem ! Ey konevan ! Wijdan bikin. vegerin ser rastiyê ! Ji Kurdan ra şepa (mecal) jînê bidin ! Bira ev gelê belengaz û pejmurde jî wek merivan bijî. Bira ew jî bibe xwediyê debistan, nivîs war, ziman, wî]e (edebiyat), çapxane, rojname, radyo ...

Bira Kurd jî bigihîje mafê xwe yê merivatî, şehrevanî, konevanî. Me di despêka nivîs wara xwe da gotibû ku di van çil salên dawîn da arkêologên Amerîkayî, Ingilîz û Fransiz di erdên împaratoriya osmanî ya
- 86 -
kevn da û di derên îranê da, li gellek ciyan, geriyan, kolan û xepirandinên arkêo lojîk çê kirin ... Xebatên wan pir meyedar bûn ji bo ronakkirina dîroka Kurdan, pir kevne rêç peyda kirin.
Ji van kevnerêçan pêva, nehrevaniyên din jî hene : stûnên yadîgarî yên ku padîşahên Asor û Kildan daçikandine ji şerên Kurdan û ji tevgerên Kurdan pir tiştan dane zanîn. Hernj, gerdiş, şe hrevanî , mêrxasî, cengawerî. bedewbûn û zîweriyêri Kurdan pesinandine.
Hezretî Ayetullah Aqa Şeyh Muhamed Merdûxê Kurdistanî di nivîs wara xwe ya dîrokê da çend nav nivîsîne. Ev kevne rêçên Mad in : li Hemedanê "Senge+şêr", li navbera Kermanşah û Qesrî-Şîrîn "Dukana Dawûd", li Loristan "Dexmeyê Duab" , "Taqê Ferhad", nêzîkî Kermanşah "Dexmeyê Dilo", li Awşarê "Textê Suleyman", li Saqiz "Kela Ma", li Pilingan "Dexmeyê Sirtaw", Kela Girîftew", "Kela Zerîm", Serwanser" ...
Bi awayê dilbaweriya me, ji bo ku buhêrka Kurd baş bête zanîn, divê di Kurdistana îro û di Kurdistana kevnare da jî ji xebatên arkêolojîk ra pir guh bidin. Divê bi sermayeyên xurt, arkêologên hêja, xebatker û jêhatî dakevin nexên (tabaqa) kûrtir û kevnerêçan derxînin, dîroka Kurdan ronak bikin.
Eger hin nîşane û kevnerêç ji bo ronay iya dîroka Kurdan di destê me da ne, ev qencî û camêrî ji zanayên Awrupayî gihîştine me. Ên ku çendikek ruyê me kenandine roavazanên biyanî ne. Kurd ji van zanayên rewanbilind û enzanperweran ra çiçend spas û şabaş bike hindik e.
Li gel vê yekê, tiştên ku Kurd dilxwaz e, evîndar e, umîdwar û bi diltengiyeke bê pîvan bendewar e, ne bitenê ev çendik e. Xwestina Kurd wekî din e :
1- Kurd divê mafê xwe bistîne, lê ne dereng, di demeke nêzîk da divê bistîne.
- 87 -

2- Deverên ku îro piraniya wan Kurd in û di bin destên Ereb, Ecem 0. Tirkan da ne, divê vegerin ji Kurdan ra, xwediyên wan ra. Maf divê bigihîje xwediyên xwe ! 0. bê entrîka, bê konevanî, bê Iîzbazî, bê rik 0. bê kîn!
3- Kurd, di Kurdistana xwe da, xwediyê serxwebûna xwe be ! serazad bibe ! dilşa 0. bextiyar be !
4- Kurd, bi vî awayî, ji her bendê azad, dest bi jînê bike, li avakirina Kurdistanê bi geşî û gumrehî - şênber 0. razber (maddî 0. manewî) - li qenciya welatê xwe bikoşe.
5- Di vê navê da, bi rêberiya zaroyên xwe yên kurd, ku ji universiteyên Emerîka û Awrûpa 0. Sovyetan guwahnave birine, bi hoste 0. şagirt 0. rêncberên kurd, hawcarên (alet> modern, bi bend 0. rêzan 0. zanayî, bi pîvaneke fireh, ger û kolanên arkêolojîk bikin, ji bin kûrayiya zerzemînan nîşane 0. kevnerêçan derxînin. kuncên tarî yên dîroka Kurd ronaktir bikin.
ŞEHRIY ARIY A KEY AZDIY AK
Di 584 B.M. da, Key Azdiyak, kurê Key Aksar, pey mirina bavê xwe, tacê Keyanî yê Mad danî serê xwe û li ser textê Keyan rûnlşt,
Lê sedhezaran muxabin ! Xûy 0. bunyadên bilind 0. hêja ku di malbata Key Kubbadê Kurd da heban, yek ji van xuyên paqij li ba Key Azdiyak neba ! Pênc şahînşahên Keyaniyan ku berî Key Azdiyak şahînşahî kiriba - Key Kubbadê Kurd, Key Kawus, Key Tos, Key Plrîbrez, Key Aksar - bi zanewerî, bi zîrekî, werzimedî (gayret) û mêrxasî, di karûbestên nîştimanî yên xwe da - hundirî, derveyî, leşkerî ... - tiştine derberz (harika) anîbûn meydanê. Bi van kamweriyên xwe cihan giş mat û dilda hiştibû.
Azdiyak = Ixtoviko, di demeke hindik da, da zanîn ku ne hêjayê textê van fêrisan e. Ixtoviko li pey

gewz, serxweşî û zirbaziya xwe digeriya û ji gelê kurd ra jî ji renc û êş û zorbatî pêve tiştek ne dikir.
Ixtoviko, dêlva ku, wek van cihangîrên ku berî wî hatlbûn û şahînşahî klrlbûn, di meydana mêranî û cengê da hesp bilîzîne, di seraya xwe da dîlber û dîlbaz didan lîstin. Ixtoviko yekî kêmpaye bû, şev û roj di dîwana wî da ji dildarî, evînbazî, meyxurî pêve tu karekî din tu nebû.

Ji alîkî hebûnên welat di riya kirêtî û gemariyê da bela bela dikirin, ji aliyê din jî ordiya neyarheras û şêrlez, li ordiya zorawer û dengdar, li ordiya parazva a Kurdistanê mihrivanî ne dikir. Ev mêrikê bedaferde, meyxur û gewzeger berê gelê kurd dabû qilafîskan, dikira gelê kurd ji zinaran werbike û wenda bike.
Pê Ş tirî herkesî, serek gewremerd {wezîr> Alpag û gewremerdên din, serleşker, giş fermandar, rîsipî û giregirên welêt hemiyan, ji vê tevgerê ra li çarakê digeriyan. Gişan zanîbû ku dawiya vê rêçûnê malmîratî, mal wêranî ye, wendabûna gel, gelê kurd e, wendabûna cîgehê kurd e. Diva bû ku ji vê serpêhatina reş û tarî û purxun ra havllekê bikin.
Mezin û giregir rûniştin û paşîkê, ji bo xweşî û candurustiya Kurdistanê, Ixtoviko ji textê Keyaniyan anî xwarê û neviyê wî Kurîş, ku padîşahê Anzan bû, kir tacidarê Kurdistan, şahînşahê Kurdan, di 560 B.M. da.
Ev tevgera daxistina Ixtoviko ji tu tevheviyê ra meydan ne da, bi hêsanî derbas bû, çû, Key Xusrew = Kurîş li textê Mad rûnişt. Azdiyak jî hat avêtin zîndanê. Gel û ordî xweşgewz û dilşa bûn. Pir muxabin, ev şadimanî pir ne ajot - em dê paşê dûr û dirêj binivîsînin - hûn dê nankoriya Ecem, lîzbaziya Paris bibînin.
Serkar û karsazên wê hengamê, ku Azdiyak ji text xist, hîç gûman nîne ku di vê tevgera xwe da

dilaqij bûn. yegane dilxwaza wan camêran ev bû ku Imparatoriya Kurd ji qiyafiskê gijok rizgar bikin. Lê. hezaran esef ! Pirsa malê û çarşiyê li hev derneket. Paris paşê. dereng dereng. bi awakî werê çiv da xwe û hoqabaziyek lîst ku ev encam nikarîbû bê bîr û bala tukesî. Imparatoriya Kurd. gelê kurd. şerevaniya kurd, navê bilind ê kurd. ji meydanê rabûn, li ciyê Kurdê fêris Parisê cotkar û pepûk rûnişt.
Lê Ecem ne şerevan ba. Kurdistan bê ordî û paraztvan ma. Iskenderê Makedonî, Omer Ibn Xettab, Selçûkên tirk, Cengîz û Hulakû yên Tarar, Qayxanî û yên din û yên din Kurdistana pir pertav, xurt û ava leyand, wêran kir. wenda kir. Paris jî perîşan û şerpeze ba.
Paşê, ceng û xerpişîn û xebatên çar hezar sal ên Kurd. xwîna kurd, pehlewaniya kurd. giş ban ên Ecem. Lê Ecem ji cî ne liviyan, dilopek ji

xwîna xwe ne rijand ! Ecemên şivan û cotkar li ser cengawerî, ciwanmerdiya Kurd venişt ! Navê Kurdê qehreman hate ji bîr kirin. Belê, zanayên fêris, zanayên rohilat û roava yên dîrokê, mezinatiya Kurd, karûkoşên wî yên giran û firazbaz ji bîr kirin, mezinatî û firazbaziya Kurd li pelên dîroka Paris nivîsîn.

Eva me ponjên xwe yên canxipar li ser dek û fûtên dllsûz ên Eceman. ku ji bo Kurdan lîstine, nivîsandin. Lê, paşê. em dê cardin vegerin vê qissê, ji nû da bigrin destên xwe, kar û dar binivîsînin. Û em dê li maf û vêrastê bigerin, em dê bi rêberiya nivîs warên dîrokan, bi nehrevaniya kevnerêçan, bi hiş û hayên weyîn (musbet), wek pişaftina qisseke aljêbrîk mafê Kurdan biaşkirînin. derînin meydanê.

Enzanîtî ku, bi xwestin an bê xwestin, gêr baye çewtiyeke dîrokî ya mezin, em dê wê ji vê çewtiyê reha bikin. Pirsên "Ancienne Perse", "Furs î Qadîm", "Eski Faris" efsane ne, mîna şapînozên pîravokan in. Ev "Ancienne, Qadîm, Eski", ano "kevnare", gelê

kurd e, ne şehriyariya Paris e. Parisê kevnare şivan bû, cotkar bû, tucar şerevanî ne kiribû û ji şehrevanî dûr bû.

PADÎŞAHEN KEY ANIYAN ÊN BELX

Me hînga xwendibû ku Key Kawus, kurê Key Kubbadê Kurd, 44 sal padîşahî kir û warwenda mir. Ji bo bijartina padîşahekî, gel li hev ne kir. Li dawiyê. li ser sazkirina du padîşahiyan li hev hat : padîşahiyek bû Hemedan. a din jî bû bajarê Belx.

Padîşahên Hemedanê me xwendin. Padîşahên Belxê jî em dê nuha bixwînin.

KEY ANIYÊN BELXÊ

ŞEHRIY ARIY A KEY LEHRASEB

Key Lehraseb di 795 B.Z. da. li bajarê Belxê , li textê Keyaniyan rûniştê. Key Lehraseb di dirêjiya şehriyariya xwe da tiştekî hêja ne kir. Navê ku di dîroka Kurdan da hişt eve: ji Zerdeştê sêyim ra piştevanî kir, firehkirina ayîna Zerdeşt xurt kir û ji bo belavkirina ola Zerdeşt pir xebitî. Di 667 B.Z. da, wî text û tacê Keyaniyan ji kurê xwe Kiştaseb ra hişt.

ŞEHRIY ARIY A KEY KIŞT ASEB

Key Kiştaseb di 667 B.Z. da, di jîndariya bavê xwe da, li Belxê, li textê Keyaniyan rûnişt. Çend sal bi şûn da, bajarê Belxê berda, bajarê Istexîr (Persepolîs) ji xwe ra kire paytext. Li Istexîr şêst û çend sal bi firazbazî û kamwerî padîşahî kir, paytextê xwe fireh kir û xemiland û seraser kişwerê xwe ava û geş kir. Di hengama Kiştaseb da gelê kurd bextiyar û serazad û xurrem bû. Ev padîşah rêznave û rêdar (nlzamname û qanûn) sazandin û durust kirin. Rêdar û saznaveyên Kiştaseb ên dadwerî (adll)

û şehrevanî (medenî> di nlvîswarên dîrokan da bi xweş perî (husnu qebûl) nivîsandine.

Bi vî awayî xuya dibe ku Key Kiştaseb di avakirina welêt 0 sazandina rêdarên dadwerî 0 şehrevaniyê da ji Key Darayê yekim ra rêberî 0 mamostatî kiriye. Key Kiştaseb 150 sal berî Key Dara ji Kurdistanê ra. jî enzanîtiyê ra riya şehrevaniyê vekiriye. Hin ji avadaniyên Key Kiştaseb heya îro payîdar mane : Kela Semerqend 0 Dîwarê Xawer.

Kiştaseb 66 sal şehriyarî kir. Di 671 B.Z. da temen payan bû, li bajarê Şîrazê hat veşartin.

ŞEHRIY ARIY A KEY BEHMEN

Key Behmen di 602 B.Z. da bû padîşahê Kurdan. li ser textê Keyanî rûnişt, bajarê Şewêş (tenişta Bexdê) kir paytextê xwe. Ev padîşahê jêhatî xwediyê çend navan bû : Behmen. Erdişêrê Dlrêjdest., Axşewî-ros , Behmenê Madî.

Key Behmen li Kurdistana rohilat serxwebûneke tumî diajot. Ev padîşahekî cihangîr bû. Nivîswarên dîrokê nehrevan (şahid) in ku Key Behmen ferweranê 127 kişweran bû (15). Ji Hindê heya Habaştstanê veklrandibû,

Ev Padîşah zana, hiş dar, karaşîna, dadker 0 mêrxas bû. Di hengama xwe da, bi bendûrêzandarî 0 karsaziya xwe bi navûdeng bû, Key Behmen Israîl (Cihû) ku li Babîlê dîl bûn, di aşîtî 0 gumrehiyê da hiştin. Kurê Buxtunnesir, Bileser, ku Key Behmen ew klrtbû waliyê Babîlê ji Benî Israîl ra neqencî dikir û ew diêşandin. Loma Key Behmen ew rakir 0 di şûna wî da kurê Camas, Kûrîş, kire waliyê Babîlê «16>.

ŞEHRIY A~IY A KEYBANÛ HOMA Y

Keybanû Hûmay keça Key Behmen e. Ji bo ku
- 92 -
birayê wê tu nebû, ew bû şahbanû û di 533 B.Z. da li ser textê Kurdistanê rûnişt. Keybanû Hûmay çil sal Banûşahî kir.
Weka ku dibêjin, Keybanû Hûmay ji bavê xwe xeyidîbû û bajarê Şewêş berdabû, hatibû bajarê Tîsfonê, Navê Tîsfon paşê bû Medayin. Medayin nêzîkî Bexdê ye. Keybanû Hûmay ZÎrek bû, tebût. bû, xebatker, xêrxwaz 0 dilovan bû.
Şehriyariya Keybanû Hûmay bi şahînşahlya Kûrlşê Mezin hemdem e. Di 494 B.Z. da Keybanû gihîşte dawiya temenê xwe.
ŞEHRIY ARIY A KEY ANIY AN LI HEMEDAN':
ŞEHRIY ARIY A KEY XUSREW': MEZIN
Gelê kurd di 558 B.Z. da Padîşahê xwe Azdiyak (Ixtovîko), ji bo ku çepelî 0 bêdadî dikir, ji Textê Keyaniyan anî xwarê û di şûna wî da neviyê wî Key Xusrewê Mezin kire Tacîdarê Kurdan.
Key Xusrew xwediyê çend navan e. Navekî wî jî Kûrtş e. Awrupayî "Cyrus" dibêjin. Lê navê rast, navê ku bavê wî lê kiriye, "Agirdad" e. Agirdad navekî kurdî ye, ne parisî ye. Eger parisî ba, ê biba Ateşdad, Malbata wî jî Kurd e, ji Xandedana Texîxî- Xenî ye, Kûtî-Amerdî ye. Ew Kurd e, ne padîşahê Ecem e, ne jî Pasargad e. Ew Padîşahê Anzan e.
Me di qisseya şehriyarlya Anzan da ji bo vê malbatê hûr 0 kûr nivîsiye. Em lê vegerin. Azdiyak kurê Madan bû. Kûriş neviyê Madan e. Azdiyak çepel bû, bêdad bû, Kûriş dadker bû, camêr bû,
Me xwendibû ku kargerînên wan deman di rakirina Azdiyakê meyxur û gewzende da tu neweyî (mahzûr) ne dît. Wan nizanîbû paşê çi bobelat û bedbextî dê bê serê gelê kurd! Wan bîr ne biribû ji vê guhartina bêteşe (adî) çi gijokiya (wehamet) dijwar wê bê
- 93 -
meydanê. Tucar ne hatiba bîr û bala wan ku ji vê guhartina sade û malbatî serxwebûn û serazadiya Kurd dê wenda bibe. Ev serxwebûna serfiraz û giranbuha ku Kurd bi şilfên xencer ên Nêrizî û Soranî. bi şûrên devbixwîn û serflrîn, bi gurzên rustemî, bi ceng û şer û mêranî bi dest xlstfbû ! Kurd 2000 sal bê rawestan. bê bînvedan, pêsîr bi pêsîr, gewrî bi gewrî. bi

neyaran ra pev çûn. Carna bê xencer û şar û çek. bi penc û neynûkan, bi dev û diranan êrîş birlbûn ser neyaran. Berê xwe ji tuttştî, ji mirin û agir, ji talanî û wêraniyê ne guhart. Wek leyî û çeman xwîna xwe rêtlbûn, Me berê jî gotiba Kurd şerên pir dirêj û bê dawî klrlbûn. Ne rojek û dudu. ne salek û deh, 2000 sal ! Çar aliyê Kurd neyar ban û neyarên xurt û pir xurt ! Akad, Sûmlr, Kildan, Asor, Hitît, Misr ...

Lê dijwartirên wan Asor ban. Asor neyarekî xwînrêj, xurt û çavsor ba ! Lê paşê pehlewanekî Kurd derket meydanê ! Ev pehlewan ne Zalê bavê Rustem ba ! Ev pehlewan ne Rustemê kurê Zal ba. Ev pehlewan Rustemê Rusteman, mêrê mêran, şêrê şêran ba. Ev Key Aksarê Dengîn ba. şahê şahan, padîşahê Kurdan ! Key Aksarê Cenga ba ! Key Aksarê şerevan û cengbaz ba !!

Ev Key Aksarê yekta û bê heval ordiyeke berbihev anî, ordiyeke nûjen û taze, kok û sazkirî. Ev ordiya Kurdan ji brûsk û bager û leyiyan, ji pola û mlfriqan, ji zinar û goman çê baba. Nînwa li ber vê bobelatê, li ber vê sosretê ling ne da ber xwe ! herifî, hilweşiya. ba axpîng !! li nav pêlên Dicle wenda ba !

Kurdên Katî û Kurtî bi yekdestî û bi yekdilî ceng dikir. serxwebûn û serazadiya xwe û imperatoriya gewre û firazbaz û nûjen a Kurdistanê serast kirin. Lê gelo çawa ba ? Kurd bi wergerandina padîşahekî gewzeger (sefîh) û payepes, bi gertevekî bê teş ev firawanî (nîmet) çawa ji destên xwe revandin ?! Mafê xwe bi gişkî ji na va wenda kir ?!!

- 94 -

Gelê Paris ku tengava kenarê Deryayê Paris rûniştgeha wan bû û ji şer û ceng û tol û dozan tim dûr bû, û ji cot û şîvaniyê pê ve tutiştî nizanibû, yek dilop ji xwîna xwe ne rijand û rojekê xencer û şure xwe - eger xencer û şûrê wan hebû - ji kalan dernexistibûn !!

Lê çawa bû ? Kurd 2000 sal xerpişî, koşiya, ranewestiya, şev û roj şer kir, ceng kir, wek leyiyan xwîna xwe ya sor rijand û di cihanê da imparatoriyeke mezin û bê heval anî meydanê. Navê Kurd bi serfirazî û bilindayî gihîşte felekan, navê Kurd ewçend brûskjen û gurîpaş bû ku padîşahên Asor bi van peyvên buhadar Kurd pesinandin "Kurd wek stêrên

ezmanan diçirisin, ne bitenê lewendî û zîwerî, bi xurtî û dijwarî û mêranî jî .....
îro Kurdan ev tiştên hêja, navên bilind mezinayî, flrazbazî, navbilindî, geş û gumrehî, şehrevanî
giş wenda kirin !
îro Ecem, Ecemê cotkar û şivan vê mêrxasî û cengawerî û cihangîriyê, hemî kiriye dastê (mal) xwe.
Me berê jî gotibû ku em dê paşê jî li ser vê qissê binivîsînin, em dê dar û dirêj, bi pejilandin, mafê Kurd derxînin meydanê. Ecem biraderan em dê bînin ser rastiyê.
Me ji bo bedbextiya Kurdan, ji bo kul û derdên Kurdan têra xwe got. Em dê cardin vegerin li ser dîroka Key Xusrewê Anzanî, ji Malbata Texîxî-KatîAmerdî- Xenî. Gava ku ew li ser Textê Mad rûnişt, tacê şahînşahiya Kurdistanê danî serê xwe, tucar ji bîr ne kir ku xwîna ku di rehên wî da digere xwîna Kurd e. Ev şahînşahê Medan e, ano şahînşahê Kurdan e û padîşahiya Kurdan dike. Piraniya gelê wî Kurd in. Nemaza leşker û ordiya bin destê wî giş Kurd in. Key Xusrew gerdişên kevnare yên şer yên Mad ne guhartin. ayîn û rêzanên padîşahên Madan ji destê xwe bernedan. Kurê Azdiyak, Key
- 95 -
Nexşeya E. Cemîl Paşa, N° 5 : sala 550 Berê Isa. Firehbûna Imperatoriya Mad di bin Key Xusrewê Mezin Q. Kurê wî Key Kawus de.
- 96 -
Aksarê duyim, kire Fermandarê ordiya xwe, neviya Azdiyak, şahbanû Sipînûy, mar kir. Kûrişê Mezin heya mirina xwe bi navê Mad, bi navê Kurd şahînşahî kir <17>'
Key Xusrewê Mezin zana, mêr, xuynerm, comerd, bilindpeyker, xebatkar û karaşîna ba. Textê imparatoriya ku li ser rûnlşttbû giranbarî û buhadariya wî qenc bîr dikir. Di karên hundir yên welat 0. derveyê welat da pisporiya xwe, sezawariya xwe xweş nîşan da.
Gava Kûrlşê Mezin li ser Text rûnişt, karê wî yê pêşîn ev ba : Wek ên Bextereyî, Ermenî ... û yên din, ji berê da binestên Mad ban, îcar serê xwe hildabûn. Wî ev giş sernişiv kirin û anîn ser rê. Paşê, Key Xusrew haydar

ba ku Padîşahê Lîdya, Krêzos, û Padîşahê Babîl, Nabonîd, ji bo neqenciya Mad yekdest bane û Misr û Yewnan jî kirine hevalên xwe.
Kûrtş bilez û bez, bi leşkerekî pir, dirêjî Lîdya kir. Gava gihîşt çemê Halis (Kiz il Irmak), ordiya Krêzos ji çem derbas baba. Dema êvarê ba. Dereng ba. Leşkerê Kûrlş mehek ba ku li rê ba, westiya bû. Lê, Kûrtşê fêris bîhnek ne da Krêzos, tavil di tengayiya êvarê da êrîş bire ser neyarê xwe. Di wan deman da, li cihanê, leşkerê Lîdya bi çekên xwe, bi bedenbazî û bendûbestên xwe, bi mêraniya xwe bi navûdeng ba. Lê vê ordiya yekta ya cihanê li ber êrîşa nişkayî ya Kûriş û li ber cengaweriya mêrxasên Kurdan ling ne dan ber xwe û şikiya.
Ordiya Krêzos kişiya, xwe avêt paş bedena bajarê Sard, paytextê Lîdyayê. Leşkerên Kûriş Sard dorpêç kir. Dorpêçiya Sard pir dirêj ne kir. Ordiya Kurd bajarê Sard - li cihanê yekta û dengdayî - bi êrîşê stand. Lîdya bû perçeke imparatoriya Kurdistanê.
Key Xusrew Krêzos ne êşand, jê ra mihrivanî û nazenînî nîşan da, Krêzos li xwe hişt, ew kire bergeştmendê (şêwlrdar) xwe. Pey vê kamweriyê,

sînorên Kurdistanê gihîştin Deryayê Marmara û Deryayê Sipî.
Ev kopişa (darbe) mal wêranî ya Kûrlş Yewnanî giş hejandin û mat kirin ! Giravên Deryayê Egê, ji girava Sîsam pêve, giş ketin destê Kurdan. Du bajarên kenarên Deryayê Sipî, Pûçê = Folêa û Mîlas = Mîles, jî ban ên Kurdan.
Bi bîrewerî û karsazî, Krêzos kesên Lîdya bê çek kirin. Lîdî, ku heya nuha şerevanên zor ban, ji vir pêda bûn bazirganên dengdayî. Kûrlş, ji bo ku karê vê kişwera na bi hêsanî bigerîne, ji malmezinên xwe satrapvan bi nav kir. Kûrlşê mezin gava ev karûkoş birin serî, vegeriya, berê xwe da Babîlê.
Israîlî = Cuhû yên ku ji salan ve li Babîlê dinaliyan bi dilgeşî û şadimaniyên bê payan riya Kûriş dipan, bi bîntengî û dilhejî li benda ordiya Kurd a kişwergîr û Kûrişê flrazbext (gallb) û cihangîr ban.
Padîşahê Babîlê, heval û yekdestê Kurdan, Nabonîd, ji Kurdan ra bêbextî kiriba. Ji bin da bi Lîdya ra yekîtî danîbû. diva ba ku Kûriş jimarteka vê gunehkariyê ji Nabonîd bipirse.

Kûrlş rasterast ajot ser Babîlê û Babîl dorpêç kir. Kûriş , bi dilovanî û mêranî, di nav çend rojan da Babîl ji Kildaniyan stand, bext da bajêr, tukesî ne êşand. Babîl ne herifand, ji parazgehan (rnabed) ra pir flrazî kir. Ji Israîlan ra jî bo vegera welatê xwe destûr da û alîkariya wan kir, ew şandin Filistînê.

Kûriş çendakî şûnda, ji bo ku sînorên Kurdistanê yên rohilat bigihîne ciyên stratêjîk ên bi keys, berê xwe da Hindistanê. Hindistan tu şerê hêja bi Kûrlş ra ne kir. Kûrtş heya çemê Sendê vesend. Kûrtş û Hind zûka li hev hatin. Kûriş bi vê geştecengê sînorê Kurdistanê heya Sendê fireh kir.

Kûrlş ji Hindistanê vegeriya, berê xwe da Qafqasan û Deryayê Reş. Dilxwaza Kûrlş ev ba ku çend

satrapên xwe - Armenya, Pond, Kapadokya - têke bin penah û baweriyê û ji Qafqas û Deryayê Reş ziyana tukesî negihîje wan satrapan. Kûriş Gurcistanê jî stend û kire satrapeke imparatoriya Kurdistanê. Bi vî awayî, sînorên Kurdistana xwe sparte çiyayên Qafqasan.

Key Xusrewê Mezin di şerê Masajêtan û çend mîrên din da birîndar bûbû. Çend roj bi şûnda, di 521 B.Z. da, temenpayan bû.

Key Xusrew enzanekî, şahînşahekî mezin bû. 29 sal bi serfirazî û bi kamiranî, bi kamwerî, şehriyarî ajot. Çawa ku cengawer û stratêj bû, ewçend jî dilovan û mihrîvan bû. Key Xusrewê Mezin Kurd firazbaz kirin, Israîl ji dîlbûnê rizgar kirin û Yewnanî bindest kirin.

ŞEHRIY ARIY A KEY KA wns

Key Kawûs di 529 B.Z. da, pey mirina bavê xwe Key Xusrewê Mezin, li Textê Mad rûnişt ,

Key Kawûs di zarotiya xwe da baş şerde ne bûbû. Bavê wî hergav jê dar, di şer û cengan da dikoşiya. Loma Key Kawûs li ber destên jinan maba, pir nazenîn û rûstandî bûbû, Key Kawûs pir payxwaz (qurre) û tengxuy (asabî) ba, û hergav wek qîma xwe dikir. Çi biketa serê wî, jê venedigeriya.

ŞERt KEY KA wns BI MISRIYAN RA

Di dema Key Xusrew da, gava ku Krêzos bi Babîl ra yekîtî danîba, ferweranê Misrê, Amazîs, jî tevî vê yekîtiyê ba.

Key Xusrewê Mezin, hêj di jîndariya xwe da, pir dilxwaz ba ku tola xwe ji Amazîs, Fîrewnê Misrê, bistîne. Key Xusrew ji bo vê karbestê xebitîbû û xwe pêk anîba. Bi kesên giravên Yewnaniyan ra yekîtî danîba, girava Qibrisê ji Qibrisiyan bi zora

- 99 -

xwe standibû. Lê, Key Xusrew di dilxwaza xwe da kamiran ne bû. Berî ku şerê Misriyan bike temenpayan bû 0 çû.

Kurê wî Key Kawûs, gava bû Padîşah, karê wî yê pêşîn ev bû : xwe zû pêk bîne 0 dirêjî Misriyan bike.

Key Kawûs di sala 524 B.Z. da, ano 5 sal pey rOniştina Text, bi ordiyeke mezin geşta Misrê kir.

Key Kawûs hêj ne ket.lbû erdê Misrê, Amazîs temenpayan bû. Di şûna wî da kurê wî Pîsamîndê sêyim bû Firewn.

Pîsamînd li Polozê çû pêşiya Mad. Lê Misriyan li ber êrîşên nO 0 dijwar ên Kurdan xwe ne girt. Misrî zû şikiyan 0 reviyan, xwe avêt paş bedenên bajarê Menfisê. Key Kawûs beyhûde rijandina xwînê ne xwest 0 ji Fîrewn ra encumenek şand, jê aştî xwest. Misriyan bêdadî 0 bêbextî kirin, şandiyên Key Kawûs kuştin 0 avêtin karên (bir) avê. Cengawerên Kurdan ji van çepelî 0 kirêtiyan ingirîn, dilreş û tengxuy bûn, êrîş bir ser birc 0 baruyên Menfisê. Bi zora gurz 0 xenceran bajarê Menfis vekirand.

Key Kawûs rewanbilindiya xwe nîşan da : Pîsamînd kirêtî 0 bêbextî klrlbû. şandiyên Key Kawûs kuştibûn. Lê, Key Kawûs kirêtiya Pîsamînd bi qencî lê vegerand:

Menfîs hil neweşand, ji Pîsamînd ra xweşdarî kir. ji Misriyan 600 peya bijartin, bi Pîsamîn ra şandin Kurdistanê, bajarê SOzê.

Key Kawûs livleşkeriyên (herekatî askerlye) xwe herdemandin (dewam kirin) 0 Misir seraser vekirand. Key Kawûs navmalbatên (Ieqeb) Fîrewnan girtin, ji Misriyan ra xweşdarî kir, tevger 0 rêzana Misrê ne guhartin. Bitenê di çend birc 0 baruyan da leşkerên Mad bi cî kirin. Lîdya 0 heldorên wê dîtin ku Key Kawûs padîşahekî dilnerm 0 mihrîvan û enzanperwer bû, pê ra şer ne kir, bê ceng û teqe req ketin bextê Key Kawûs, welatê xwe spart wî.

- 100 -

Key Kawûs paşê ket sewdayê vekirandina Qartaca. Lê Fînîkiyên ku ji Key Kawûs ra deryavanî dikir, ne xwest şerê hemgelê xwe bikin. Loma, ev dilxwaza Key Kawûs ne çû serî.
Paşê, Key Kawûs leşker kişand Hebeşistanê. Hin ciyan vekirandin. Lê, di vegera xwe da pir tengayî kişand 0 pir ziyan gihîşt leşkerên wî.
Key Kawûs gava li Misrê karûbarê xwe bire serî, berê xwe da welatê xwe Kurdistanê. Dema ku gihîşt Sûriyê , di laşê wî da hin birîn çê bûn. Ji ber van birînan, di 521 B.Z. da, temenpayan bû.
ŞEHRIY ARIY A KEY DARA YE YEKIM
Key Kawûs warwenda mir. Key Darayê yekim, ano Darayê Mezin, bi bijartin bA padîşahê Mad. Key Darayê yekim jî mîrekî Anzanî bû, ano Kurd bû. Darayê Mezin di sala 521 B.Z. da bû padîşahê Medan. Key Kawûsê kişwergîr ê Misr 0 Afrîka ji Dara ra imparatoriyeke mezin 0 ordiyeke bê heval û yekta hlştlbûn. Di van deman da, sînorên Kurdistanê ji aliyê rohilat digihîşt pehnava (wadî) Send, ji bakur digihîşt Deryayê Kaspîn, çiyayên Qefqasan 0 Deryayê Reş, ji roava digihîşt Deryayê Marmara 0 Deryayê Sipî, ji aliyê nîvro kişwerên Misrê 0 Lîdya standibûn hundirê xwe 0 ketlbû nav Hebeşistanê.
Le !! Ordiya Kurdistan ! li cihanê, ne li Rohilat 0 ne li Roava, ne jî li tu ciyan ordiyeke evçend xurt, evçend navdar 0 sazidar hebû ! Ev ordiya fêris, Asor 0 Babîl wenda kirtbûn, bi bîne kê Anadol 0 Misr veklrandlbûn. Ev ordiya Kurd li cihanê bê heval bû, yekta bû. Lê, çi sûd ! Dara, Darayê Mezin vê firavaniya ku bûbû miratxurê wê rûmeta wê nlzanibû. Dara serekanayî 0 xurtî 0 cangehê wî dezgehî li ku ye, çawa ye, ne didît.
Dara kete çewthişî 0 çewtbinî : hinek gewremerdên Parisî 0 biyanî di seraya xwe da clvandlbûn, peyv 0
- 101 -
şîretên wan gewremerdan kire serê xwe, riya şoveniyê girt, ji fermandar û gewremerdên kurd vekişiya, veciniqî, ji Kurdan tirsiya, keça xwe li yekî ûrim mahr kir. Navê vî ûrimî Mardonyos bû. Paşê jî Mardonyos kire serekleşkerê xwe. Fermandariyên gezdik biçûk jî dan Ermeniyan û biyaniyên din. Fermandarên kurd ku Key Xusrewê Mezin 0. kurê wî gihandibûn şahriya vekirandlnê ji ordiya Dara bi dûr xistin. Dara

fermandar û leşkerên Ermenî. Yewnanî, Kapadokî, Gurcî, Lîdî, Flnîkî, Misrî, Hebesî ji Kurdên qehreman çêtir girt û Kurd ji xwe bi dûr xistin.
Dara rêke xwar û çewt girtibû. Dara di bin destê gewremerdên parisî û biyanî da gû] bûbû, riya rast berdabû, berê xwehermendê dabû qllafîskan ! Dara bi bingeha xwehermendê dilîst ! Kandijê wendaker ê Sûmir 0. Akad û Elam. Key Kubbadê Kurd ê bingehdarê xwehermenda Mad; Key Aksar, bajargîrê Nînwa: Kûrlşê Mezin û kurê wî Key Kawûs, her du kişwergîrên Rûm û Babîl, Misr û Afrîqa ev xwehermend ava ktrlbû. Dara bi bingeha vê bilindseraya gûripaş û ronak a şahînşahan dilîst. Lîstina vê bilindserayê çiçend mal kuj 0 mal wêranî bû, Darayê mezin ne didît !!!
Dara seraya xwe bi biyaniyan tije kiribû. Welatparêzên rast, welatparêzên bi dilûcan, xwediyên vêrastên vî welatî, ku giş Kurd bûn, ji wan tiştên cangudaz pir diêşiyan, bêzar 0 purxûn bûbûn. Bi rastî, gel giş ji van tevgerên çewt ên Dara dilşikestî bO.. Dara ji şîret û hişyarkirinên rîsipiyan 0 emekdaran ra, ji gewremerd, fermandarên karasîna ra guh ne dida. Li hundirê welat dilnexweşî ji berê va pirtir dibû. Lê, Dara ser riya rastiyê venegeriya, li ser gotina xwe serhişkî kir û ma !! Loma, pir ne ajot, li gelek ciyan şoreş 0 tevdaniyan dest pê kir. Dara şoreşên Babîl, SOz, Belx, di du salan da vemirandin. Dara ji van serhllanînan pir endîşnak ne bûbû, Şoreşa ku Dara dilhej 0 pirxûn kiribû şoreşeke din bû. Ev şoreş li nîvekê welêt rabûbû : du mîrên
- 102 -
Mad ji rêçûna Dara ra qîma xwe ne anî. Dara ziyankariya welêt dikir. Loma, van her du mîran, Çetertexme û Ferwertîş, şoreş rakir. Ev her du mîr ji neviyên Key Kubbadê Kurd bûn. Dara ji bo vemirandina van şoreşan sê caran di bin fermandariyên ermenî leşkerine giran şandin. Her sê caran jî leşkerên Dara şikiyan. Dawiyê, Dara bixwe ket pêşiya ordiya xwe, leşker û cengawerên xwe giş bi xwe ra hilanîn, ajot ser her du mîrên Mad. Herdu mîr. ku ji bo rizgariya welatê xwe rabûbûn, şerine dijwar kirin, bi mêrxasî di meydana cengê da pehlewanî û qehremanî kirin. Lê, sêwlekên sedhezaran ku Dara dabûn hev bi kuştin û jêkirin ne diqediyan. Paşê. çetertexme di meydana mêraniyê da bi serfirazî hate kuştin. Firawertîşê

bedbext bi birîndarî ket destê neyarê xwe. Dara Firawertîş bire Hemedanê, bi renc û îşkence ew kuşt !!!
Ev tevgera Dara bêdadî û nakorî bû. Dara, bi van kirinên xwe yên ne enzanî, bingeha Kurdistanê hilweşand, împeratoriyê davête qilafîskan. Lê, Dara ji çavsorî û payexwazî riya rast wenda kiribû !! Diva bû Dara ji van mîrên Madan ra mihrivanî û nermayî nîşan bida.
Dara ji bîr kiribû ku xwîna ku di rehên wî da digeriya xwîna kurd bû, tacê ku danîbû serê xwe tacê kurd. textê ku li ser rûniştibû textê kurd bû. Dara gewremerdên kurd ji seraya xwe, cengawerên kurd ji ordiya xwe dûr kirin, ne dîtin, xwe ji imparatoriya xwe jî, tac û textê xwe jî di zinaran da wer kir.
Dara wek padîşahên pêşiya xwe - Key Kubbad, Key Aksar, Kûrlşê Mezin - di ordiya xwe da li dildarî, bendûbest û fedakarî ne digeriya. Van tiştên ku rewan û canê ordiyê ne, Dara guh ne didayê. Dara digot qey bi gihandina jimara ordiya xwe li milyonan dikare cihanê gişî têxe bin lepê xwe. Dara pir xapiya !! Dara bû engîza wendabûna imperatoriyeke xurt û fêris. Ji ruyê Dara, ji bîrnebirina Dara, imperatoriya mezin a Kurd wenda bû.
- 103 -
Ji ruyê Dara Insekenderê Makdonî Kurdistan da ber lingê xwe ! Ji ruyê Dara Omer Ibn Xettab Kurdistan û Parisistana biçûk bê rûmet kirin 0 di xwîn 0 agir da hiştin. Ji ruyê Dara Mongol, Tatar, Tirk 0 Taclk Kurdistan talan kir, wêran kir !!!
Dara, pey vemirandina şoreşên her du mîrên Medan, çetertexme 0 Firawertîş, dest pê kir karûkoşên hundir 0 derveyê welêt şehrevanî, kargerînî, leşkerî, konevanî, bazirganî ...
Dara, berî hertiştî, ji bo ku imparatoriya xwe ya fireh, bi bawermendî, asûdegî 0 rêzandarî bigerîne, welatê xwe bi 23 satrapan, ano wilayetan, beş kir. Her satrap satrapdarekî wî hebû, di her satrapê da, ji satrapdar pêve, fermandarekî leşkerî 0 jimardarek hebû, Ev her sê fermanberên mezin xwediyên serxwebûnê bûn, ano bi serê xwe bûn.
Satrapdar ji xebtûkarên hundir ên satrapa xwe 0 ji berhevdana derd 0 bela berpirsiyar dibû, bendekariya (wazîfe) fermandarê leşkerî, nêrtin 0

xwedîkirina sînorên satrapa xwe bû. Jimardar jî di hundirê satrapa xwe da karge rînî , leşkerî, konevanî, bazirganî ... çi bibûya. çi biqewimiya, çi bidîta, çi bibihîsta, di va bû tav il ji Dara ra binivîsîne 0 Dara ji her gertev 0 bûnişan agah bike.

Dara, ji bo ku di imparatoriya xwe da xebtûkarên bazirganî 0 leşkerî 0 bajarvanî bi lezûbez 0 bi bawermendî, bi ewlemendî bigihîne, Kurdistan seraser bi riyan xemiland. Di cihanê da birîdevanî (posta) Dara saz kir. Di dirêjayiya riyan da seraser veniştegahan (menzîl) çêkirin, karwanseray, birîdegahan ava kirin. Li her veniştgehê fermanbir 0 peymanbir bi nav kirin.

Birîdevanî ku di şehrevaniya îro da rolekî mezin dilîze li cihanê bingehdarê wê yê pêşîn Darayê Mezin bû.

Dara, gava van xebtûkarên bergiran bire serî, dest pê kir sînorên imparatoriya xwe bigihîne derên

ewletir Û tebûttir. Berê, ji bo ewlemendiya sînorên rohilat, karê geştecenga Hindistanê kir. Endezvan (muhendis) û osteyên Finîkî anîn. Keştiyên cengê ku Finîkan çêkirin ji Babilê berê xwe dan Deryayê Hindê. Dara jî bi ordiyeke giran di reşayiyê ra gihîşte sînorê Hindistanê. Pehnava çemê Sendê ji Hindiyan stand û berda ser kişwerê xwe û çendakî bi şûn da vegeriya Babîlê.

Pey ewlemendiya sînorê Hindistanê, Dara xwest sînorên roavayê imparatoriya xwe, ano aliyê Yewnanistanê, jî tê ke bin ewlemendiyê. Berî ku rasterast dirêjî Yewnanistanê bike, diya bû rêvegera xwe bixe bin ewlemendiyê.

Sît ji rohilata kenarê Daryayê Reş heya devê çemê Tunayê (Danûb) belav bûbûn û li van doran cî girtibûn. Van Sîtana ji bo Dara metirseke (tehltke) mezin bûn. Sîtan, di hengama Key Aksar da, Kurdistan, Qafqasya, heya Lîdya girtibûn û ew der pir êşandlbûn, Rohilatzanên îro bi nehrevaniyên nû Sîtan blrrekî Kurd dizanin. Sît mêr bûn, dijwar bûn, di bin dest 0 lepan da ne dihatin girtin, şerevanên bijare bûn, Lê, hij ji bendûbest 0 rêzan ne dikirin. Gava keys 0 şep 0 fesal diket destê wan, ji Awrûpa heya Qafqasya didan ber xwe 0 talan dikirin.

Dara, ji bo ku li geştecenga Yewnanistanê ji Sîtan serêşaniyekê nebîne, xwest berê bajo ser Sîtan, wan şerde bike.
Dara, ji bo şerdekirina Sîtan, bi ordiyeke 800.000 leşker, ji Babllê berê xwe da geliyê Istanbûlê. Endezvanên Finîkî li geliyê Istanbûlê pirek danîn, gava pira Istanbûlê li ser sazkirinê bû, pireke din jî li ser çemê Tunayê girêda.
Ordiya Dara ji geliyê Istanbûlê derbas bû. Berê kişwerê Trakya vekirand, paşê berê xwe da rohilat. Pira ku li ser çemê Tunayê ava kiribû, ordiya Dara jê derbas bû, heya çemê Dinyesper ajot. Dara ji
- 105 -
Sîtan ra wekî ku diva bû, şerdeke xurt nlkaribû bide. Dara dev ji Sîtan berda, vegeriya Trakyayê, hin ji leşkerên xwe li Trakya hişt 0 berê xwe da Babilê.
Dara, bi standina Trakya, êdî bi firê qe tî kartbû dirêjî Yewnanistanê bike 0 ji Sîtan tu paxî neke.
Dara, piştî saleke din, di bin fermandariya zavayê xwe Mardonyos, 100.000 leşker li keştiyan siwar kirin 0 ji bo vekirandina Yewnanistanê şandin. Keştiyên di bin fermandariya Mardonyos da gihîştin Yewnanistanê. Li tengava Maratonê lengerendaz bûn û ordiya Mardonyos derket deştika Maratonê.
Ev şerê ku di dîrokan da binavûdeng e di 12 Îlon 490 B.Z. da, di navbera Yewnanan 0 Madan da, çê bû,
Ordiya ku di bin fermandariya zavayê Dara Mardonyos da bû diva bû Maratonê bistîne, paşê berê xwe bide Atîna 0 Yewnanistanê vekire. Ordiya biçûk a Yewnanistanê ! Ordiya mêrxasan ! Ordiya welatparêz û cengaweran ne hişt ordiya Dara ya sed hezarîn ji Maratonê gavek pêş bavêje !!! Çengek cengawerên Yewnanî mîna şêrên ingirrî êrîş bir ser ordiya Dara ya sed hezarîn !!!
Ordiya mezin, ordiya Darayê Mezin ku ji heftê 0 du gelan berhevhatlbû li ber kopa êrîşa dijwar 0 noyên qehremanan 0 canfeşanên Yewnaniyan ling ne da ber xwe. Ordiya Dara hezaran kuştî dan, bi şermsarî şikiya 0 bi perîşanî reviya ! Ev ordiya Kurd bi feremandariya Mardonyosê ûrlm navê bilind 0 serfiraz ê Mad hildigirt. Ordiya Mad heya vê demê bi kişwergîrî 0

bajargîriya xwe di şer 0 êrîşan da bi dilîrî, qehremanî, mêranî 0 canbêzariya xwe cihanê gişti ttrsandibû 0 lerlzandibû. Gîtî tev li mêrxasî 0 cengaweriya Kurd mat 0 lal 0 dilda mabû. Yewnaniyan jî digot qey li hembera xwe van Madên ku bi qêrîna xwe ya blrûskasa 0 mifriqjen ku şêran dilerizandin dê bibînin, 0 bi rastî jî dilhej bûn 0 ponijî bûn.

- 106 -

Belê, Darayê Mezin Padîşahê Mad bû, Padîşahê Kurdan bû. Lê, ordiya Darayê Mezin ne ordiya Mad bû. Ordiya Key Kubbadê Kurd 0 Key Kûrtş ne ev ordî bû ! Ordiya Dara ji 72 gelan 0 hawişan dahevdayî û ordiy eke geremolan bû ! Serfermandar jî Mardonyos bû ! !

Pey vê encama dilkuj 0 şermsariyê, Dara weherand (qerar stend) ku ew bixwe biçe geşte cenga Yewnanê. Darayê Mezin sê salan bi karê cengê koşiya, lê temenê Dara qîm ne kir. Ew di sala 487 B.Z. da temenpayan bO. Di rojên dawîn yên Dara da, Misr ser hildabû,

Key Serxes, kurê Darayê Mezin, di sala 487 B.Z. da li Textê Mad rûnişt. Karûkoşên pêşîn ên Key Serxes çûna şerê Misriyan bû. Di rojên dawîn ên Dara da Misr serê xwe raklribû. ji bo şerdekirina wê, geştecengek ber bi Misrê çêkir. Di demeke hindik da Misrî şerde kirin 0 vegeriya Babilê.

Me berê nivîsandibû ku Dara, piştî şerê dilkuj ê Maratonê, weherandlbû ku ew dê bixwe biçe şerê Yewnanistan. Ji bo vê yekê, sê sal bû karê xwe yê şer dikir.

Belê, Darayê Mezin di karê leşkerî da tu kêmanî ne hlşttbû. Bi hezaran hezar leşker civandibûn, hespên siwaran bê heval bûn, enbarên çekên nûlen û bijare bi devê dagirtî bûn, xwarin, dirav, her tişt pir bû 0 pir bû. Lê, di ordiya Darayê Mezin da. di vê ordiya hezaran hezaran da, ku bi vî rengî pêk hatibû 0 karûbariklrî bû, gelek muxabin ! yek tişt jê kêm bû : rewanê cengawerî ya Key Kubbad.

Di ordiya Key Dara 0 Key Serxes da, navûdengê ordiya Mad ku qehremanî, pehlewanî 0 canbêzariya wê li felekan belav bûbû, jê tu şop 0 nîşan ne mabû. Ordiya Kurd a karûbarklrî, bi rewanê bilind ê bexşîşên Key Kubbadan, Key Aksaran 0 Key Xusrewan, li meydanê tu nebû,

Ordiya Mezin ku Darayê Mezin di sê salan da bi xebateke germî 0 kel berbihev anîbû bi çendiya

- 107 -
(kerniyet) xwe ji ordiya Maraton pirtir bû, Lê, bi çewayiya (keyflyet) xwe gellek kêmtirê wê bû 0 jê bedter bû. Ev ordî ji heftê 0 du gelan civandî bû 0 ji têxên (kom) enzanan pêve ne tiştek bû.
Ev Ordiya Mezin, ku Darayê Mezin bingeha wê danîbû 0 paşê ji Key Serxes ra mîrate mabû, ji Misrî, Habeşî, Lîdî, Ermenî, Yewnanî, Finîkî ... 0 ji gelên din civandî bû. Key Serxes ji bavê xwe, ji Darayê Mezin, mîratxurê ordiyeke di vî rengî da bûbû. Gava Key Serxes siwar bû, da pêşiya ordiya xwe ya giran 0 mezin, piraniya leşkeran, girêdanên rextûbendên siwaran, çelengan 0 lewendan, bi hezaran hezar cengawerên bi çek 0 cilên nûjend 0 gûrîpaş ew serxweş dikir, ji gewz 0 şadiyên xwe Key Serxes hişwenda bûbû !!
Key Serxes wer bawer bûbû ku bi vê ordiya dêwasa, ne bitenê Yewnanistanê, lê cihanê gişî dê vekirîne! Key Serxes, di 480 B.Z. da, li pêşiya ordiya xwe, bi flrazbazî riya Yewnanistanê girt. Pira ku li Dardanêl (Çanaqale) danîbû, jê bi rewşeke şahane derbas bû, kete Tirakyayê. Keştîcengên Key Serxes - pirtirên keştiyan 0 deryavanan flnîkî bûn - paşê ji Deryayê Ege derbasî Deryayê Yewnanistanê bûn.
Serleşkerê Key Serxes cardin zavayê wan ê ûrlm, Madonyosê binavûdeng, bû. Ev ordiya şeşelanî ya Key Serxes ji Derbendê Termopîl dê derbas bibûya û Yewnanistan gişî dê bida ber xwe !!
ŞER1: CIGESÛZ 1: TERMOPYL
Lêonîdas, padîşahê Isparta, li Derbendê Termopî1 bi sêsed cengawerên can bêzar li benda leşkerên hezaranhezar ên Key Serxes bû.
Di 480 B.Z. da, qehremanê qehremanan Lêonîdas, Padîşahê Isparta, bi sê sed kurên xwe yên dilawer, bi sehgura sibê ra êrîş bir, xwe avêt ser ordiya milyonan a Serxes. Lêonîdas, Padîşahê dilpola, welatparêzê zorbazû, 0 sê sed cengawerên dilîr 0 yekta 0 şêrêşêran xwe kir goriyên welatê xwe yê şîrîn 0 firazbaz !
- 108 -
ŞERt;: SELAMYN

Yewnaniyan paytextê xwe Atîna vala kiribû, kişiyabûn girava Selamînê. Mardonyos bi ordiya xwe kete Atînayê. bajar vekirand û wêran kir. şewitand, ji belengazên ku ketin destên wî bilêc (qetlîam) kirin.
Kewteyê (Filo) - koma keştîcengan - biçûçik ê Yewnaniyan xwe pêk anîbû ku girava Selamînê biparêze. Kewteyê Key Serxes ku ji neyarê xwe deh caran pirtir bû, dirêjî avtenga Selamînê kir. Li avtenga Selamînê cengeke mezin a deryayî çêbû. Li ber çavê Key Serxes kewteyê Medan bi awakî perîşanî şikiya. Key Serxes ordiya xwe stend, ji geliyê Dardanêl derbas bû, reviya Babîlê !
Mardonyos bi sê sed hezar leşkerê xwe va li Yewnanistanê ma. Zivistana xwe li Trakyayê derbas kir. Yewnaniyan jî seraserê zivistanê bi xebtûkoşên cengê derbas kir. Buharê, Mardonyos dirêjî Yewnanistanê kir. Li Pilatê şerek kiribû. Di meydana şer da Mardonyos hat kuştin. Ordiya Mad bê serî ma, perîşan bû, şkest û reviya. Ên berşûrmayî li keştiyan siwar bûn, xwe reha kir. Li ser riya vegera xwe, li hemberî girava Sîsamê, li pozê Miraqê, ji nû da bi Yewnaniyan ra ketine şer. Ordiya Key Serxes a bê ser û bin cardin şkest û belabela bû. Keştiyên wan bicarek hatin şewitandin. B.Z. 479.
Pey van şkestinên bi rûreşî, Key Serxes di seraya xwe da, bê fedî û bê mejî, xwe da xwarin û vexwarin û gevzendegî. Fermandarê ordiya bendewar (xas) a Key Serxes, Artabanos, jar da Key Serxes û ew jardadayî kir û kuşt. B.Z. 465.
Artabanos, Dara, kurê Key Serxes, bi kuştina bavê wî buhtan kir. Paşê mirarkeriya Artabanos derket meydanê. Artabanos jî, zarokên wî jî giş hatin mirandin.
ŞEHRIY ARIY A ERDIŞYRt;: YEKIM
Key Erdişîrê yekim, kurê Key Serxes, di 465 B.Z.

da, gava li Textê Mad rûnişt., hêj zarok bû. Paşê ku mezin bû, xebt 0 karên kişwerê xwe girt destê xwe, ji bo avakirina hundirê welatê xwe koşiya, ne bi Yewnanistanê, ne jî bi hemsiyên xwe yên din ra şer kir. Rojên xwe bi aştî 0 şadimanî derbas kir.

Berî mirina wî, şerên Yewnaniyan ên hundirî - şerên Peleponîs - dest pê kirlbû. Bi dîtina hevdukuştin 0 perçekirina neyarê xwe dilhênik bû.
Key Erdişîrê yekim di 424 B.Z. da temenpayan bû.
ŞEHRIY ARIY A KEY DARA Y~ DUYIM
Key Drayê duyim di 424 B.Z. da du birayên xwe kuştin 0 li ser textê padîşahiya Mad rûnişt. Ji bo xweş gerandina welêt pir koşiya, lê bi tu awayî kamwer ne bû,
Lîdya 0 Misr fermanşikenî kir. Çend mîrên Mad jî ser rakir. Di 20 salên şehriyariya xwe da tu demên xweş bextî ne dîtin. Di 404 B.Z. da temenê xwe payan kir.
ŞEHRIY ARIY A ERDIŞIR~ DUYIM
Key Erdişîrê duylm, kurê Key Darayê duyim, di 404 B.Z. da li Textê Mad rûnişt. Birayê wî Key Xusrew fermanşikenî kir, neyartiya birayê xwe kir. ji Yewnaniyan 13.000 leşker anîn.
Di navbera her du biran da şerine dijwar 0 xwînrêj çê bûn, Key Xusrew di meydana şeran da hat kuştin 0 ordiya wî şkest, ji hev belav bû.
Erdişîrê duylm, pey kuştina birayê xwe, bi Yewnaniyan ra sê meh şer kir. Paşê. Erdişîr generalên Yewnanî xandin (dawet kirin) saraya xwe, ew kirin mêvanên xwe. Hezaran muxabin ! Erdişîr di saraya xwe da bi bêbextî mêvanên xwe tevde kuştin (18).
ŞEHRIY ARIY A ERDIŞIR~ S~YIM
Key Erdişîrê sêyim di 358 B.Z. da li text rûnişt, Padîşahiyek xwînxwar. bêdad bû, Ezbeta xwe, jin 0

mêr, bê dilovanî û mîhrîbanî bilêc kir. Key Erdişîr fermanşikeniya Finîkya û Misr vemirand, parastekê Misriyan (Boxêapîs) bi destê xwe kuşt, bajarê Seyda yê Finîkiyan şewitand, kesên wê bilêc kirin, ên ku ji ber şûr reha bûn kire dîl, di bajaran da firotin.
Key Erdişîr, dawiya dawî, gihîşte mafê xwe ! Bi destê Fermandarê xwe Bogoasê Misrî jardadayî bû. Bogoas bi evçend jî qîma xwe ne anî, zaroyên Key Erdlşîr giş kuştin.
Şehriyariya Key Erdişîr di .338 B.Z. da gihîşt dawiya xwe.
ŞEHRIY ARIY A KEY DARAYÊ SÊYIM KEY DARAYÊ MADÎ

Key Darayê sêyim, pey Key Erdişîrê seyrm , li Babilê, di sala 338 B.Z. da, li textê Mad rûnişt. Ji Darayê sêyim ra Darayê Madî jî dibêjin.
Fermandarê bendewar ê sarayê, Bogoasê Misrî, li çara wendakirina Key Darayê sêyim jî digeriya. Lê, Dara ji vî bêbextî ra fesal ne da, zûtir rahiştê Û ew fermandarê bêbext û çepel wenda kir.
Key Darayê sêyim ji ezbeta Key Kubbadê Kurd e, neviyê şahbanû Hûmay e, neviyê qehremanan e. Loma, di dîrokan da ji vî Padîşahî ra Darayê Madî dibêjin.
Belê. Key Darayê bedbext neviyê Key Kubbadê Kurd e. Lê çi sûd ! Textê ku li ser rûnişt ne textê nahej û tebût ê Key Kubbad e !!
Padîşahên Anzanî yên ji ezbeta Texîxî-Kûtî - AmerdîXenî pey Kûrlşê Mezin û Kurê wî Key Kawûs li ser Textê Mad rûniştin. Tevger û xuyên Kurd ên sade, lê bilind, paqij û xurt berdan. xwe ji bîr kir ku ji reha Padîşahên Anzanan in, peyhatiyên Kûtî-Amerdiyan in. Hezaran muxabin ! Van Padişahên peyhatî yên Key Xusrewan, pertewfiraziya sarayên xwe, xurtbûn, jêhatîbûn û tîravêjbûna pêştirên xwe girtin.
- 111 -
Tuwangerî Û darayiya (dewlemendî) gel di sarayan da feşartin, hebûna gel giş dane gewzegerî û xweşşademaniyan. Tuwangerî, darayî û bazarvaniya welêt wenda kirin.
Padîşahên ku di pey Kawûs ra hatin navê Mad ku neyar dilerizandin ne dianîn bîra xwe. Van padîşahana pirtirên gewremerd û serleşkerên xwe ji biyaniyan dibijartin : Yewnanî, Ermenî, Misrî, Finîkî, Lîdî ... Gewremerdên Kurd û serleşkerên Kurd ji sarayên xwe, ji ordiyên xwe dûr xistibûn û ji bîr kiribû ku Key Xusrew û kurê wî Key Kawûs, ev her du şahînşahên ku navê Mad bi serfirazî li xwe girtibû, bi xebtûkoş û canbêzariyên gewre merd û serleşker û cengawerên kurd ji pîrozbexiyekê gihîştibûn pîrozbextiyeke din !
Lê, di ordiyên padîşahên mayîn ku pey Key Kawûs hatibûn da fermandar û cengawerên fêris û şerevan ên kurd kêm kêm xuya dibûn. Mezinên Kurdan ên xeydan û purxun kişiyabûn koşe û tenhayê, bi kul darî û dilbirînî li van tevger û gertevan temaşa dikirin.

Padîşahên ku pey Key Kawûs , kurê Key Xusrewê Mezin, li Textê Mad rûniştin bawer kiribû ku Key Kubbadê Kurd, Key Aksarê bajargîr, Key Xusrewê Mezin û gelê Kurd ê cengawer imparatoriyeke firazbaz û navê cihangîriya giran bi xebtûkoşan, bi dildariya Kurdistan, bi jîr Û mejî û hunermendî, bi rêtina xwîna sor wek çem û leyiyan anîbûn meydanê.
Darayê Mezin û peyhatiyên wî dê çawa karibin welatê giranbiha û serfiraz bi leşker û fermandarên biyaniyan û bi dirav û zêran kirrî ji dijminan biparêzin? Key Darayê yekim hêj di destpêka ferweraniya xwe da ji Mîrên Mad ku ji bo mafên xwe di nuxûna wî da rabûbûn tirsiya û pir dil hejî kir. Loma, saraya xwe û ordiya xwe bi biyaniyan û Parisiyan tije kir. Darayê Mezin ku ji Tacûtextê xwe pêva tiştek ne dianî bîra xwe ev awayê çewt û kirêt serrast kir û ji vê yekê jî şermsarî û rûreşî anî ji bo gelê Kurd, ji bo navê cengawerên Kurd. Lê.
- 112 -
hezaran efsûs 0. muxabin ! Padîşahên paş hatî yên Darayê Mezin jî ev awayê çewt 0. kirêt ji hevûdu hevand (taqlîd kir) û çûn, Loma, Artabanosên Yewnanî, Bogoasên Misrî, biyaniyan 0. bêbextan bilindayî, mezinayî 0. girancahiyên sarayan xlstlbûn, gerdişên pak 0. mêrane yên kevnare serûbin kiribûn.
Saraya Keyaniyan êdî ne ew saraya girancah 0. pertewpaş a kevnare bû. Ev saraya pertewdar a gewre bûbû meydaneke çepel 0. dilbixwîn : bêbextî, mirandin, kuştin, jehirandin.
Darayê sêyim - Darayê Madî - bo. şehriyarê xwehermende ke rengparisî, padîşahê biyaniyan! Ferweranê xwehermendeke kosmopolît !! Ev şahînşahî bi navê şahîn şahiyeke Mad bû, padîşahiya Kurdan bo. ! Lê, bi rastî, di vê şahînşahiyê da tu rewş 0. heykel 0. pêjn 0. xuyên Mad 0. Kurdên kevnare tu nebû !!
Darayê Mezin berî du sed salan rewan 0. peykera vê şahîn şahiyê we rgerandibûn, serûbin klrlbûn, niştimanê Kûtî 0. Kurtiyan radestî (teslîm) Biyaniyan - ên wek Mardonyosan - kiribû ! Loma, hezaran hezar leşkerên wî 0. yên kurê wî li ber çend Yewnaniyan şikiyan ! Rûreşlya revê li Maraton, li Salamîn, li Mîkal ... anîn ser ruyê ordiya Mad !!

Ji van gertevên tarî 0. bednav, ku di dirêjiya du sed salan da dîroka Kurdistanê bi şermî 0. bedbextî tijî kir, bi van kirêtiyan şeş padîşahên Anzanî ferweranî kir. Lê, pir muxabin ! Her şeş padîşah jî riya pirkujare 0. metirs 0. çewt 0. xwar berneda ! Çavkorî 0. nezaniyên xwe, serhişkiyên xwe bernedan! Di du sed salan da, ordiya Keyanlyan, ên Anzanî, di destê biyaniyan da, li ser rêzanên kevnare 0. dûrbîn ên Keyaniyan venegeriyan ! Ordî di destê bêbext 0. nezanan da ma !!

Gava ku Darayê Sêyim tacê Kurdistanê danî serê xwe, hezaran muxabin, ordiya ku ji Erdişîrê sêyim mirate gtrtfbû, mîna ordiya Darayê Mezin, ordiyeke genî, pejmûrde 0. ji biyaniyan daglrtîbû. Belê, Darayê sêyim, Darayê bedbext gava ku tacê Keyaniyan danî serê xwe bûbû Mîratxurê ordiyeke ewha !!

- 113 -

Darayê seyim Padîşahekî dilrast bû, dilpaqij bû, xebatker bû, û kujarişê ku ji roava, ano ji Yewnanistanê. bihata didît û jê haydar bû. Ji bo vê yekê jî, ji dilûcan rahişt xebtûkoşeke germ û hêja. Di kargerînî, bajarvanî. leşkerî da bihterîşeke zor pêşve dibir : satrabdar û bendekarên (memûr) ku ji xwarina xûgî û tazîkirina gel pêva tiştek ne dikir avêtin, guherandin, rêderketî û xwedî sûcan rind şerde kirin. Çandinvanî û bazirganî xistin bin parazmendiya xwe, pejilandina (lsraf) sarayê jî rawestand. Paşê, rahişt bihterîşa ordiya xwe. Key Darayê sêyim, gava bi van karûkoşên bergiran kariwer (meşgûl) dibû, hergav di hiş û bala wî da ev qisseya bergiran hebû : vegerandin û vejandina xurtiya kevnare ya ordiya Mad !!

Du sed sal berî padîşhiya Key Darayê Mezin, Darayê yekim ruyeke (usûl-awa) pir çewt û çepel serrast kiribû ! Ordiya xwe ji gelên rengareng, ji heftê û du gelan, bi zora dirav û zêran anîbû meydanê, û ev ordiya heftê û du reng kiribû parazvanê imparatoriya Kurdistanê. Dawiya vê çewt û çepeliyê çawa bû me dît û me xwend. Her du kopên (darbe) dijwar: Maraton û Salamîn, ji bo Kurdan çi şermsarî ! çi rûreşî bûn !! Parazvanên welatekî kurên wî bixwe ne. Kurên biyaniyan di meydana ceng û mêraniyê da ji bo welatê kesan xwîna xwe narijînin. Paraztina welêt ji biyaniyan hêvî kir. Nîgaş (xeyal) siya daran e. Darayê sêyim dixwest wek bapîrên xwe, Anrt-Daprizan, Kandijan, Key Kubbadan, Minwaşan,

Sardonişan, Key Firîbrezan, Key Aksaran, Key Xusrewan, Key Kawûsan, Key Ferhedan ... ordiyekê bîne meydanê : xurt, girancah, berzavêj, bi bendûbest , bedenbaz û şerevan. Darayê sêyim qenc bawer kiribû ku bi ordiyeke di vî babetî da ew karibû rizgariya welêt bike, welatê giranbiha ji neyaran biparêze. Key Darayê sêyim kujarişa ku ji roava, ano ji Yewnanistanê, tê dîtibû û bîr dibir ku ev metirs ji bo Kurdan malmîratbûn e, gijokiyeke dijwar e, lê Dara ji vê metirsê ra tu berbend û

- 114 -

çare peyda ne dikir. Maraton û Salamîn hergav di bîra wî da bûn : ev şermsarî, rûreşî karibû bicare (tekrar> bibe. Dara, ji bo ne carandina gijokiyeke ewha, li çarekê digeriya Û çare jî peyda kiribû : vejandina ordiya Mad !! Lê, vejandina ordiya Mad ne hêsan bû. Diva bû berî hertiştî biyaniyan ji ordiyê derîne û ciyê wan bi kurên welêt dagire, ano, bi Kurdan. Di imparatoriya Mad da du pejikên (unsur) bergiran hebûn, Kurd û Paris. Di imparatoriya Kurdistanê da jimara Paris pir hindik bû, bi zorî 10%ê gel Paris bûn. 90%ên mayîn Kurd bûn. Dara vêrasta hanê ji herkesî çêtir zanibû. Loma, Dara dixwest ku, mîna dema bavpîrê xwe, Kurdên cengawer bibin mejî, movikên piştê û bingeha ordiya wî. Muxabin ! Pirtirên Kurdan ji dema Darayê Mezin, ano ji du sed sal ve, ji karûkoşên xwehermendê destên xwe kişandibûn. Darayê Madî ne karibû Kurdên xeydan û purxun aş bike û bîne ser karê xwehermendê. Êdî ji vê xwehermendê ra baweriya Kurd ne mabû, pirên wan kişiyabûn çiyayên xwe. Dawiya dawîn, Darayê sêyim digel xebtûkoş û dilpaqijiya xwe ne karîbû têra ordiya xwe Fermandar û cengawerên Kurd peyda bike. Ji aliyê din jî, ji berê da jimarên Parisan di ordiyê da pir hindik bûn. Parisî hawuşekî kêm bAn. Li bakurê rohilata kenarê Deryayê Paris, Şîraz 0 Pasargatê cî girtibA. Ji xwe Parisiyan ne merivine cengawer bûn. Şer û pevçûn ne bi dilê wan bû û hij jê ne dikir. Parisiyan cotê xwe dikir 0 pezê xwe diçêrand. Di van demên dawîn da, carna xweşbesteyên (şiir) dilrevîn û xweşaheng digotin.

ŞERÊN DARA BI ISKENDERÊ MEZIN Ê YEWNANI RA

Darayê sêyim digel xebtûkoşa xwe ya bi canûdil kadroyên, ordiya xwe bi qîma dilê xwe ji kurên welêt nikaribû dagire 0 serrast bike. Leşkerên

ordiya Darayê sêyim jî, mîna pêşhatiyên wî, ji heftê û du gelan berhevbûyî ma. Ordiya Darayê sêyim jî,
- 115 -
mîna ordiyên pêşhatiyên wî, bê bendûbest., bê bedenbaz, bê zanewerî bû , gilorek merivên tevlihev bû ! Lekên Darayê sêyim ên rêzandî 0 bedenbaz 0 zane wer pir hindik bûn.
Eger paşimtê (reqîb) Dara çend salên din jî hilmvereyî bikira 0 ji Dara ra weşan (flrsat) bida. dibe ku Dara têra xwe lekên rêzane 0 bedenbaz serrast bikirana. Lê, pir muxabin ! Paşimtê Dara jê ra vê weşanê ne da. Berî ku Dara têra xwe lekên sazdar, tebût 0 karûbarkirî ber bi hev bîne, paşimtê wî ji Dardanêl derbas bû, dirêjî imparatoriya Kurdistanê, kişwerê Darayê sêyim, kir. Evê ku dirêjî Dara kir Qralê Yewnanî Iskenderê Mezin bû (20).
Lê, ordiya biçûk a Iskender mêr. canbêzar, çekbaz û hunerwer bû. Leşkerên Iskender ji zarotiya xwe da her celeb libatgerî (jîmnast.îk) , bedenbazî dikirin û zanewerî, şerevanî hîn dibûn, Leşkerên Iskender şûrhingêv, mertêlgêr 0 tîravêjine zor bûn. Di her awayên şerhînî (manavra) , şerevanî, şebxûniyê da pispor bûn ! Leşkerên Iskender di cihanê da yekta bûn.
Ji vê aşkaftinê xweş xuya dibe ku dawiya kopandina her du ordî dê çi bibe !! Di navbera her du ordiyan da - di sê demên cihê da - sê şerên mezin çê ban: yek di sala 334 B.Z. da, nêzîkî Deryayê Ege, di rexê çemê Nîfos da. Ê duyim di sala 333 B.Z. da, li Kilîkyayê, li deşta Edenê, nêzîkî Ipos-Tersûs, Ê sêyim di sala 331 B.Z. da, li Kurdistanê, li deşta Hewlêrê - Erbîl -.
Ordiya Darayê bedbext li her sê cengmeydanan bi perîşanî şkest. Di cenga Iposê da. diya Dara, jina wî, du keç û kurekî wî ketin destê Yewnaniyan. Iskender ji kesên Dara ra nermdilî 0 mihrivanî nîşan dan.
Pey şerê Ipos, Iskender ne ket pey ordiya Dara, bi standina bajarên kenarên Deryayê Sipî kariwer ba. Paşê, berê xwe da Misrê. Misr seraser girt, avakirina bajarê Iskenderiye ferman kir. Iskenderê Mezin
- 116 -
evçend kişwer û bajaran di du salan da vekirandin. Wî li Misrê ordiya xwe mestir kir, xurttir kir, karûbarê xwe tekûz kir û vegeriya ser Dara.

Darayê sêyim li deşta Hewlêrê li benda Iskender bû. Ordiya Dara îcar jî li ber kopandina ordiya Iskender ling ne da ber xwe. Ordiya Darayê bedbext şkest, perîşan bû, ji hev belav bû. Du leşkerên Hemedanî yên bêbext Dara kuşt.

Iskenderê Mezin ji Hindistanê heya Deryayê Reş û Deryayê Sipî Kurdistan û Parisistan vekirandin. Paşê, hin ciyên Hindistanê jî girtin. Lê, leşkerên wî ne xwest pêşvetir biçin. Iskender ji neçarî vegeriya Babîlê. Iskenderê Mezin, Iskenderê cihangîr, gava ji Babîlê bi planên vekirandina gişî cihanê kariwer bû, nexweş ket, di nav şeş rojan da temenpayan bû. B.Z. 323.

- 117 -

PEY MIRINA ISKENDER!: MEZIN XWEHERMENDA SELEKOS LI KURDISTAN!:

Klşwerên ku Iskenderê Mezin vekirandibûn pir fireh bûn: ji Yewnanistan heya Hindistan, ji Deryaçê Aralê heya Beyabana Mezin a Afrîqayê dirêj dibûn. Pey mirina Iskender, ev kişwerê fireh di navbera generalên Iskender da bi sî û çar ciyan parvebû. Jixwe, berî rakirina termê Iskender, generalên wî rahiştibû hev û di nav wan da berberî dest pê kiribû. Paşê, pey van xerpişînan, şerine dijwar 0. cengine xwînrêj çê bûn. Li nav generalên pirxwaz û çavbirçî yên Iskender ên binavûdeng ev ban :

Pêtolêmêos-Batlanyos, Pêrt.ikas , Lêonidas, Antigonos, Lêonatos, Aleksandros, Kiyoyas, Lizimakos, Nêarkos, Sê lêkos, Omoyis. Navê van generalan "Diyaduk" bû, ano paşhatiyên Iskender.

Generalên pirxwaz ên Iskender bîst sal ne westiyan, bîhn ne da xwe, xerpişîn û şer kirin. Kişwer talan kirin, wêran kirin, şewitandin, bajar hilweşandin, herifandin. Di gellek ciyan da, mezin û biçûk ne gotin, bilêc kirin. Carna kesên bajarekî giş, jin û mêr, keç û kur, dîl kirin, di bajaran da firotin.

Ev keşrnekêş û xwînrêjî bîst sal ajot. Pirên wan generalên pirxwaz û bêdad an di şeran da, an bi destên leşkerên xwe, hatin kuştin. Dawiya dawîn, sê general ev kiş werê fireh di nav xwe da par kir:

Antigonos bû Qralê Yewnanistanê 0. Makêdonya, Pêtolêmêos-Bat lanyos Misr ji xwe ra bir, Sêlêkos dest da ser kişwerên ku Iskender li Asya vekirandiban 0. xwehermendeke no. serrast kir. Navê vê xwehermendê

bû Selefke. Di sala 312 B.Z. da Sêlêkos bû Qralê Selefke. Ev klşwerê gewre 0.
- 119 -
buhuştasa ku Sêlêkos dest da ser welatê giranbuha û pirfiraz ê Kûtlyan û Kurtiyan bû (21).
Sêlêkos li Babîlê rûnenişt. Li ser çemê Diclê bajarekî nû ava kir, navê wî kir bajarê Selefke û ji xwe ra kire paytext. Bajarê Selefke di demeke hindik da bû bajarekî mezin û xemilandî. Babîl, paytextê Sûmîr û Akad û Kil dan , paytextê Hamorabî yê Nebexe, paytextê Anrî- Dapriz ê Kurd, ê Kandi] , padişahê Kasiyan, paytextê Kardûnya, ano Kurdan:
Babîl, bajarê Merdûxê pirfiraz û flsûnkar, xwedan û parazgehê Sûmîr û Akad û Kilde: Babîl, bajarê gewre û rewşen: Babîl, bajarê bazirganan, tuwangeran, roj bi roj kêm bû, vemirî, hêdî hêdî hilweşiya û herifî ... !!
Sê lêkos kişwerê xwe yê fireh û ji gelên rengareng dagirtî nlkartbû dûr û dirêj di destê xwe da bigre. Pirên Kurdan di demeke hindik da ji bindestiya Sêlêkos derketin. Ferweraniyeke Mad a biserxwe çê bû. Çend mîriyên din jî serrast bûn, Bitenê hin bajar 0 deştên Kurdistanê di destê Sê lêkos da man.
Di sala 280 B.Z. da, gava ku kurê Sêlêkos, Antokyos, bû qral, li ser çemê Oront (Asî) bajarekî nû ava kir 0 navê wî kire bajarê Antokyos (Antakya), paşê ferweraniya xwe ji Selefke rakir, anî Antakya. Antakya bû paytextê xwehermenda Selefiye. Ji bo vê yekê, aliyê rohilatê kiş werê xwe di demeke hindik da wenda kir.
Di destê ferweraniya Selefkiye da bitenê Anadol 0 SOrya man. Ji sînorê Hindistanê heya Deryayê Reş cardin vegeriya ji xwediyê xwe ra, ano ji Kurdan ra. Kurdistan ji nû da gihîşt serxwebûn û azadiya xwe : Kurd du xwehermend çê kirin :
1- Xwehermenda Mad, di Kurdistana navîn da.
2- Aşek, neviyê Key Kubbadê Kurd, jî xwehermenda Aşkaniyan li Kurdistana rohilat serrast kir.
Xwehermenda Selefkiye li Antakya 250 sal ferweranî kir.
- 120-
WENDABûNA ŞEHRIY ARIY A SELEFKE LI KURDISTAN!:

XWEHERMEND!:N KURDAN

Me nivîsandibû ku klşwerên fireh 0 bêpayan ku Iskenderê Mezin li Asya vekirandibûn baban para generalê wî Sêlêkos. Ev erdê hanê ji ber çend xwehermendan ma ba, gelên bê jimar tê da dijîn, zimanên rengareng dipeyivîn, ol 0. gerdişên wan jî ji hev cihê ban.

Gelo li vî erdî Sêlêkos dê kariba dar 0. dirêj ferweranî bike ? Ev ne tiştekî hêsanî ba. Evçend zordestî ji her merivî dûr ba. Vê qlsseyê, Antokyos, kurê Sêlêkos, baş bîr blrlbû. Loma, Antokyos paytextê xwe ji bajarê Selefke rakir, bir Antakyayê <li Sarya, li ser çemê Asî>' Aliyê rohilatê klşwerê Antokyos, ano Kurdistan, bi vî awayî ji paytextê na, ano ji Antakyê, bi hezaran kîlometre dar ma. Kurd jî bi hêsanî keysa xwe li Antokyos anî 0. rab an ser xwe, li hev civiyan, dirêjî ordiya Antokyos kir, leşkerê Antokyos şikand 0 du xwehermendên mezin ên Kurdan serrast kirin. Yek ji wan xwehermendan navê xwe xwehermenda Mad danîba, 255 B.Z. X wehermenda din jî li rohilatê Kurdistanê serrast baba. Navê wê jî ba xwehermenda Aşkaniyan.

Antokyos nema dikarlbû ev kişwerê fireh dûrûdirê] di destê xwe da bigirta. Jixwe di hengama Iskender da jî Kurdistan seraser ne hatiba vekirandin. Ciyên dar ên derbasok ên leşkerî serxwebûnên xwe ji dest bernedabûn, li pir ciyan Mîriyên serazad serrast bûbûn.

- 121 -

XWEHERMENDA MAD LI KURDISTANA NA VÎN Di Kurdistana navîn da, di sala 255 B.Z. da, li nixûna ferweraniya selefke rabûn, fermanşikênî kir, bi Selefkiyên Yewnanî ra şer kir, ordiya wan şikand û xwehermendeke mezin a kurd serrast kir. Navê vê xwehermendê kir X wehermenda Mad. Ev xwehermend ji destpêka xwe heya du sed sal çi kir ? Çi hat serê wê ? Çi wergerek hatin serê wê? Ev 200 sal çawa derbas kirin ? Çend padîşahên wê hatin ? Navên wan çi bûn ? ... em nizanin.

Em di nivîs warên dîrokan da rastî zanegiyê ne hatin. Lê, çend serhatiyên wan ên dawiyê, ano ji bingehdanîna xwehermenda wan 200 sal bi şûnda, ket destê me : Mirata Iber, Saîd Paşa, rûpel 316-318:

Venûn, kurê Ferhadê çarim, Padîşahê X wehermenda Aşkaniyan, di sala 35 B.Z. da li ser textê Aşkaniyan rûniştibû, lê padîşahekî bedxuy û

kargerînekî çewtçepel bû. Kesên welat tevde di nuxûna wî da ban. Rojekê, bi hev ra fermanşikenî kir, xwest Ve nan ji Text daxînin, di şana wî da padîşahê Mad Erduwanê sêyim li textê Aşkaniyan bidin rûnlştandln. Padîşahê Mad. Erduwanê sêyirn, bi ordiya xwe ajot ser Venûn. Ordiyên her du padîşahan ketin meydana şer. Şer dirêj kir, cengawerên her du aliyan jî ji yek xwîn û ji yek malbatê ban. Lê. çi sûd ! Îro roja mêraniyê ba, roja mêrxasî û pehlewaniyê bû ! Bira ji birayê xwe ra rûmet ne dikir ! Gome û zinar rastî hev hatibûn ! Guştîriya şêr û pilingan ba. Siwar miqlacî û hunerbaziyên xwe. peya şûrhlgêvî û mertalgêrînên xwe nîşan didan ! Çingîna kalmlsriyan. xuşîna şûrlkên riman, qêrînên box û beranan erd û ezman dihejandin ! Ev roj çi roj bû ! Roja kurê bavan, roja canbêzaran û canfeşanan ba ! Kuştin û mirin di bîra kesî da ne bû ! Ev hezaran qehreman û pehlewan ji yek dê û ji yek bav ban. kurên Katî û Kurtiyan ban. Ji bo çi hevûdu dikuştin? Ji boçi xwîna hev dirijand? Dilxwaza wan çi ba? Armanca wan çi ba ? Ev hezaran qehreman û pehlewan ji bo yek dilxwaz û armanc. ji bo yek

tişt bi erzanî 0 bi herweyî xwîna xwe dirijand, can û rewanên xwe didan ! Vî tiştî herkes ji xwe ra dixwest ! Her yek dixwest keç 0 bûk jê ra bilîrînln, lê jê ra bitenê !!!

Çerxa felekê, bişkê bext bi Venûn ra ne keniya ! Evçend kuştî 0 nalîn 0 ax 0 wax beyhûde çê bûn, leşkerê Venûn şkest, du tac 0 du text ji Erduwan ra man !!

Erduwanê sêyim bajarê Medayin stend. Medayin di wan hengaman da paytextê xwehermenda Aşkaniyan bû. Lê wê gavê, Medayin bajarekî biçûk bû 0 pir ne ava bû. Erduwanê sêyim ji bo avakirin 0 xemilandina medayin pir xebtûkoş kir, pir guh dayê. Paytextê xwe fireh kir 0 xemiland. Lê, her du kurên Erduwanê sêyim, Wardan 0 Baqûr, di hengama padîşahiyên xwe da ji bavê xwe bêtir xebtûkoş kir, bajarê Medayin bi sazkarî 0 canfeşaniyên salan kir pay textekî ronak 0 zîwer, mezin 0 çeleng. Erduwanê sêyim 0 padîşahên peyhatiyên wî her du xwehermendên Mad 0 Aşkanî gihandin hev 0 yekandin. Ev xwehermenda yekandî li Medayinê ferweranî kir.

Di hengama van Padîşahan da, sînorên Kurdistanê ji Hindistan digihîştin heya Deryayê Reş 0 Sipî.

XWEHERMENDA AŞKANIY AN

Kurd di sala 2055 B.Z. da, ji bindestiya xwehermenda Selefke rizgar bûn. Di Kurdistana navîn da bi serxwebûnî xwehermendeke Kurd anî meydanê. Navê vê xwehermendê kir Xwehermenda Mad. Bi danîna vî navî rewanê pak 0 Key Kubbadê Kurd kir şad 0 xurrem.

Sî sal bi şûnda, ano di sala 225 B.Z. da, li aliyê rohilatê Kurdistanê, li sînorên Hindistanê xwehermendeke din a Kurd serrast kir. Navê vê xwehermendê kir X wehermenda Aş kaniyan.

Xwehermenda Aşkaniyan di sala 225 B.Z. da hat serrast kirin. Qehremanek ji ezbeta Key Darayê

- 123 -

Madî, Aşek = Arşek, ji aliyê bakurê Belxê ala serxwebûnê rakir 0. kete pêşiya Kurdan, dirêjî ordiya Selefkiyan kir 0. ew şikand, bajarê Damexan xist bin destê xwe, ji xwe ra kire paytext. Bi vî awayî bingeha xwehermenda Aşkaniyan danî.

Di destpêkê da paytextê xwehermenda Aşkaniyan bajarê Damexan ba. Paşê Medayin kir paytextê xwe. Ferweraniya Aşkaniyan 451 sal di kişwerê Key Aksarê Bajargîr ê Nînwa da ajot. Sînorên kişwerê xwehermenda Aş kaniyan , wek hengama Key Aksar , heya Deryayê Reş dirêj diba. Kesên vî kiş werê fireh 90% Kurd ban. Şahînşahê wan Kurd ba, zimanê gişkî Kurdî ba. Imparatoriya Aşkaniyan imparatoriya Kurdan ba.

Kesên vê imparatoriya fireh 0. firazbaz giş yek nejad ban, giş ji nejadê Endo-Awrupayî ban Kurd, Paris, Sexdî ... Ev hawiş tevde pismamên hev 0. yeknejad ban. Lê çawa ku me berê gotiba, piraniya mezin 90% Kurd ban, şerker 0. cengawerên wan bitenê ji Kurdan ban.

Belê, evên ku bi Sûmîr, Elam, Kildan, Asor, Hitît 0. Misr ra şer kir, xwîna xwe rijand 0. di meydanên ceng 0. şeran da canfeşanî 0. canbêzarî kir kurên Kurdan bûn. Parisiyan, di van çend hezar salan da, yek dilop ji xwîna xwe ya şîrîn ne rijand ! Rojekê bi tu kesî ra ceng 0. pevçûnek ne kir ! Li dora Deryayê Paris 0. Şîraz 0. Pasargat cotê xwe kir, pezê xwe çêrand.

Ev meriv cotkar 0. şivan ban, ew (Aştîperwer> ban ! Bac didan, ji şer 0. cengan dar diman! Dixwar, vedixwar, gewzûşadî dikir (22).
Key Darayê Mezin sûcekî mezin kir, Parisî 0. biyanî anîn, li ser karê xwehermend 0. ordiya xwe danîn. Paşê jî ji heftê 0. du milletan ordiya xwe tijî kir 0. bi şermsariya Maraton meyweyê sûcê xwe çinî. Peyhatiyên Darayê Mezin jî şopa Dara berneda. Loma. rûreşî 0. malmîratiya mezin a Erbîlê çê ba ! Imparatoriya ku Key Kubbadê Kurd ber bi hev anîba, Iskenderê Mezin di sala 331 B.Z. da da ber lingê xwe. Paşê jî, di sala 312 da, generalê Iskender,

Sêlêkos, destê xwe danî ser welatê plrflraz û giranbiha yê kurd.
Lê pir ne ajot, Kurdên canfeşan û canbêzar wek şêran qûriyan, dirêjî Selefkiyan kirin. Hêj ji bingehdanîna xwehermenda Selefke 57 sal derbas ne baban.
Di Kurdistana navîn da, di sala 255 B.Z. da, Kurd fermanweriyeke Mad vejand. 30 sal bi şûnda, di sala 225 B.Z. da, neviyê Key Kubbadê Kurd, Aşek, ala serxwe banî bilind kir û xwehermenda Selefke ji Kurdistanê avêt, di şana wê da xwehermenda Aşkaniyan a Kurd anî meydanê.
Awrûpayî, bê mafî û çewtî, ji xwehermenda Aşkaniyan ra xwehermenda "Part" dibêjin. Ecem, Ereb û Tirk jî "Fursî Qedîm" nav lê dikin û jê pak dibin.
Bingehdarê xwehermenda Aşkaniyan Aşek e. Aşek neviyê Key Kubbadê Kurd e. Ano, Aşek bi xwe Kurd e. Leşkerên Aşek jî giş Kurd ban. Ji bo azadiya Kurdistana xwe ya şîrîn û rengîn xwîna xwe rijand, Imparatoriya Kurdistan ji destên peyhatiyên Iskender derxist. Di van şeran da, yek dilop xwîna Ecem û Paris ne rijiya. Ecem û Paris li Şîraz û Pasargadê bi gewzûşadî dema xwe derbas dikir, serê xwe ji xaniyê xwe dernedixist.
Ev klsse eşkere ye, wek rojê xuya ye : xwehermenda Aşkaniyan xwehermendeke Kurdan e, ne xwehermenda Ecem e, ne jî xwehermenda Paris an e. "Ancienne Perse", "Fursî Qedîm", gotinên vala ne, pirsên saxte ne, xweşbestên (şair) nîgaşperest (xeyalperest) ên wekî Firdewsî ji ber xwe derxistine. Şehrevaniya Ancienne Perse û Fursî Qedîm jî pirsên

nezanan in. Carê xwehermendeke Faris çê ne baye. Şehrevaniya wê ya kevnare ji ku çê ba ?
Şehrevaniya kevnare, şehrevaniya Kurd a kevnare ye, şehrevaniya Kasiyan e. Wan Kasiyên ku di sala 1765 B.Z. da Klldan vekirandin, di Babîl da 700 sal fermanferma ban. Avayiya Babîl, xemla Babîl, şehrevaniya Babîl duta û çarta kirin. Şehrevaniyên kevnare yên Lolobûm, Harî, Mîtanî, Nehrî, Mad,
- 125 -
Mannaî ... bû, Ev şehrevanî şehrevaniyên van xwehermendên kevnare yên Kurdan bûn.
Padîşahên Asor, endazvan (muhendis), pîşewer (senetkar), hunerwerên KOtî, Kasî, Lolo, bi dirav 0 zêran dilxweş dikirin, dibirin Nînwayê 0 bi van zana 0 hunerweran Nînwa dixemiland. Bi saya van Kurdan Nînwa ronaktir, rewşentir 0 dilrevîntir dibû,
Padîşahên Asor bîrnave (xatira), stûn 0 beryadên (abide) ku daçikandin, pir caran li ser van keviran pesna zîwerî, mêrxasî 0 hunermendiya Kurdan nivîsandine.
Rojhilatzan 0 arkêologên awrûpayî li Kurtdlstanê, bi ger, bi xepir 0 kolan, li ser Kurdên Kevnare pir kevnerêç derxistine. Ev kevnerêçên KOtî 0 Kurtiyan in, ano yên Sûbarî, HOrî, Mîtanî, Lolo, Kasî, Madî, Mannaî, Kûtî-Amerdiyan in. Ano, giş ên Kurdan in. Yek kevnerêçeke Parisê Kevnare derneketiye meydanê. Gelo çima ? Çima ku Parisên kevnare "Fursî Qedîm" carê di cihanê da tu nebûn.
Di dawiya nivîs wara me da, hûn dê pirsigoyekê (meqale) bixwînin. Em dê, di vê pirsigoyê da qisseya Fursê Qedîm 0 Kurdistana Kevnare rind 0 pejilandî, rastiyê derînin meydanê.
Ji Padîsahên Aşkaniyan, di 450 sal da, 37 Pa dîşah li Textê Kurdistanê raniştin. Navên van Padîşahan ev in : Arşek, Tîrdadê yekim, Erduwanê yekim, Feryapantosê yekim, Mihirdadê yekim, Ferhadê duyim, Erduwanê duylm, Mihirdadê duyim, Menûçehr, Senaradîç, Ferhadê sêyim, Mihlrdadê sêylm, Hûrdê yekim, Ferhadê çarim, Ferhadê pêncim, Hûrdê duyim, Venûnê yekim, Erduwanê sêyim, Tîrdadê duyim, Sînay, Wardan, Xudrey, Mlhirdadê çarim, Pelasê yekim, Venûnê duyim, Pelasê duyim,

Erduwanê çarim, Bakurrê yekim, Xusrew, Akisdar, Pelasê sêyim, Bakurrê duyim, Pelasê pêncim, Pe lasê şeşim, Erduwanê pêncim.
Ji van 37 Padîşahan, bitenê ji tevgerên sê Padîşahên hêja 0 mêrxas em dê xwendevanên xwe agah bikin.
- 126 -
Padîşahên jêhatî, camêr, xebatker, dûrbîn û mêrxas ev her sê Padîşah in :
1- Mihirdadê yekim, padîşahê sêyim.
2- Ferhadê duyim, kurê Mihirdadê yekim. 3- Hûrdê yekim, padîşahê panzdeyim,
ŞEHRIY ARIY A MIHIRDADÊ YEKIM
Padîşahê Aşkaniyan, Mihirdadê yekim, di sala 157 B.Z. da bû Padîşahê Aşkaniyan. Mihirdadê yekim padîşahê sêyim ê Aşkaniyan e û ev padîşah pir rahiştmen (rnuteşebbis l, xebatker, karaşîna û dûrbîn bû. Kirdariya (icraat) wî ya pêşîn ev bû : di wan deman da, li Baxterî, Hemedan, Babîl û Mêzopotamyayê, mîrên serkeş hebûn. Ev mîrên serkeş yek bi yek bindest kirin û yekîtiya Aşkanî bi cî anî. Paşê, bi dadkerî û mihrivanî rahişte avakirina welêt, pêşvebirin û gumrehkirina kişwerê xwe. Di gel van karûkoşan, ji bo paraztina sînorên welêt, rahişt çare û karûxebtan : Selefkiyên roava yên Anadolê ku paytextê wan Antakya bû - herçend ku Kurdistan ji destê wan çûbû - hêj kişwerekî mezin di destê xwe da digirt û ferwertyeke zor diajot.
Ev qralên Antakya, ev qralên Yewnanî, peyhatiyên Sêlêkos, kopê mejîrê] ê dijwar ji destên Kurdan xwaribûn, hêj êşa xwe ji bîr ne kiribû. Ji canûdil dixwest heyfa kevn a bav û kalan vegerînin. Ji bo vê yekê, ji salan ve, karûkoşeke zor dikir. Ordiyeke bê jimar û xurt berbihev anîbû. Li roja keys û fesalê digeriyan.
Mihirdadê yekim, padîşahê Kurdan, ji van xebtûkoşan, ji van karûbestên Selefkiyan haydar bû. Mihirdadê cuwan û canfeda rîsipiyên germûsar dîtin, fermandarên kevnare yên şerûcengan derbaskirî, emekdarên karaşîna û xudanbext, şîretkerên zana û nebexe dabûn çarnikarên xwe.
Vê encumena şîretkeran, ercumend (fadil) û nebexeyan, serleşker û fermandarên bijare, bi rojan û

- 127 -
mehan bemaveke (program) durust û tebût berbihev anî. Bi vê bemaveyê dest bi xebtûkoşeke zor giran kir. Armanca wan paraztina sînorên welêt bil, paraztina bilindayî û serfiraziya imparatoriya Kurdis-tan bû. Bi van xebtûkoşên meh û salan, şev il rojan, ordiy eke xurt, cuwan, bedenbaz, hunerwer il bi bendûdest anî meydanê. Vê ordiya Kûtî û Kurtiyan çav dibilbisand û dil dikutand ! Peyayên vê ordiyê tîravêj, kemendirêj, şûrhingêv, mertalgêr û rimbazine bê hawe bûn. Siwarên vê Ordiyê miqlac, çerxzîz, gurzkop, şûrkêş û rlmlîzên yekta bûn. Dawiya dawîn, roja kurên bavan, roja pehlewanan û canbêzaran hat. 147 B.Z.
Qralê Selefklyan, Dîmîtriyos, ji paytextê xwe, ji Antakya ordiyeke giran û bêjimar, ordiyeke sed hezaran, ordiyeke şepxûnan dîtî, têr çekkirî, rapêçayî dabû dû xwe, êrîş bire Kurdistanê.
Mihirdad ji Pêşdarên Ordiya xwe, ji tevgera neyar her dem û gav agahdar bû. Ciyên stratêjîk girtibûn, bi agahî û hişyarî ordiya Dîmîtriyos dipa.
Pir ne ajot, du Ordî dirêjî hev kir. Her du alî jî cengawer û hunermend bûn. Pir ji hev kuştin, gelek xwîn rijand. Lê, paşê kernendavêjên Mihirdad padîşahê Selefkiyan dîl girt. Ordiya Dîmîtriyos şkest û perîşan bû. Mihirdad bi gewz û şadî vegeriya Meydanê, Dîmîtriyos bi xwe ra anî, ew dilxweş kir û jê ra mihrlvanî nîşan da.
Li sînorên Hindistanê serkeşî il tevhevî çê bilbil. Mihirdad berê xwe da Hindistanê, bi Hindiyan ra çend ceng çê kirin, hergav leşkerên hindî şkestin. Mihirdad ket hundirê Hindistanê. Bi vî awayî sînorê xwe fireh kir il vegeriya Medayinê.
Mihirdad, pey van kamweriyan, şahînşahiya xwe li çar kenarên xwe bang kir. Mihirdadê Şahînşah 14 sal imparatoriya Kurdistanê kir, hengama xwe bi firazbazî, kamwerî, bedxwarî Û mêrxasî derbas kir. Di 138 B.Z da temenê xwe payan kir.
- 128 -
PADÎŞAHIY A FERHADÊ DUYIM
Padîşahê Aşkaniyan, Ferhadê duylm, kurê Mihirdadê yekim, Padîşahekî bijare yê Aşkaniyan bû.

Ferhadê duyim di sala 139 B.Z. da li ser text rûnişt. Padîşahê hef tim ê Aşkaniyan bû. Ev Padîşah jî wek bavê xwe xebatkar, canfeşan û dadker bû. Ji bo avayiya welêt û gumrehî û geşiya gel pir koşiya. Ferhad jî, mîna bavê xwe, baş bîr biribû : serxwebûnî Û bextiyariya welêt berî her tiştî ordiyeke xurt dixwaze. Loma, ordiya ku ji bavê xwe mîrate girtibû li ba wî pir giranbuha bû. Ev ordî perçak ji canûcîgerê wî bû. Ordiya Ferhad hergav amade, li benda neyaran bû.

Ferhadê duyim ji zû da agah bû : Antokyosê hef tim, qralê Selefke, li vegerandina tolan digere. Dîlbûna bavê xwe, pe1işandina ordiya Selefke ji bîr ne kiriye. Loma. Antokyos xebtûkoşên giran dike, ordiyeke mezin dike bîne meydanê.

Antokyosê hef tim pir dereng ne ma, bi ordiyeke mezin, xurt û rind karûbarkirî dirêjî Aşkaniyan kir.

Çend cengên no. dijwar û xwînrêj di navbera Kurdan û Selefkiyan da çê bûn : di cenga pêşîn da, ji cuwanî û kêmpisporiya Ferhad, Selefkiyan zor da Kurdan. Lê, Ferhad ji vê şkestinê bê umîd û purxun ne bû. Ordiya xwe xurtir, bedenbaztir û karûbartlr kir.

Pir derbas ne bû, şer ji nû da xweş bû. Di cenga duyim û sêyim da Selefkiyan pir kuştî dan, meydana cengê berda, bi şûnda kişiyan. Di cenga çarim da, ordiya Selefke bicarekê ji hev ket, şkest û perîşan bû. Qral Antokyos di meydana cengê da hate kuştin.

Ferhadê duyim ê mêrxas û dilpola 12 sal padîşahî kir. Di sala 127 B.Z. da, di nav ordiya wî da serkeşî û tev heviyek çê bû. Di hengama vekuştina tevhev iyê da hat kuştin.

- 129 -

PADYŞAHIYA HûRDt: YEKIM

Hûrdê yekim di sala SS B.Z. da li ser Text rûnişt. Hêj nû bûbû Padîşah, Ordiya Romanî şep (keys) ne dayê, ji nişkava dirêj kirê (23).

Roma di bin fermandariya Krêzos, Serhengê dengîn, bi ordiyeke giran hatibû ser Aşkaniyan. Hûrd hîç dudilî ne kir, ket pêşiya ordiya xwe, ber bi Krêzos lezand. Krêzos berê xwe dabû Mêzopotamyayê, ber bi rohilat dişûşikî.

Hûrd Sûrnay kiribû serleşkerê ordiya xwe. Sûrnay serleşkerekî zor zana û hunermend bû. Hêj di destpêka şer da, bi mêrxasî û zorbaziyên leşkerên xwe û bi hunerweriya xwe ordiya fêris a Roma şkand. Krêzos ji bivênevî (neçarî) ordiya xwe paş paş kî kişand. Krêzos jî, wek Sûrnay, di danişmendiya leşkerî da hunerwerekî zor bû. Krêzos bi zanayî û hunermendî ordiya xwe ji pelişandin û wendabûnê rizgar kir. Bi rêzanî û bendûbestî ber bi roava ordiya xwe paş ve bir. Bi saya manewra û taktîkan, di navbera her du ordiyan da - Kurd û Roma - minizîş (ternas) ne ma. Lê, Sûrnay ne dixwest bi hêsanî nêçîra xwe ji destê xwe berde. Bi flrebînî, bi ewleyî û tebûtî ket pey neyarê xwe.

Paş du heftan, li deşta Hewranê, cardin her du ordî ketin pêsîra hev, ji nû da cengên dijwar pê kirin. Her du alî jî bi mêranî û hunerbazî dirêjî hev dikir. Dawiyê, bext bi Kurdan ra keniya, li meydana cengê serleşkerê Roma Krêzos hat kuştin. Kurd ordiya Roma bi dijwarî kopand, ji hev jend û herifand! Pey vê kamweriyê, Hûrdê yekim heldorên Antakya bi kiş werê xwe va girêda û vegeriya Medayinê. Paşê, dema xwe bi avadaniya welatê xwe derbas kir. Di sala 37 B.Z. da temenpayan bû.

ROjf:N DAWI yEN XWEHERMENDA AŞKANIY AN Me bi awakî kurtebirî çîroka xwehermenda Aşkaniyan xwend. Ev xweherrnend , çawa ku pir rojên pertewdarî û mezinayî dîtin, ewha jî yek caran tengî, tevhevî jî

- 130-

derbas kirin. Nemaza, gava di sala 220 B.Z. da dubendî ket navbera xanedana padîşahî. Pelasê sêyim di nixûna birayê xwe Erduwanê pêncim da rabû, Tac û Text ji birayê xwe bi darê zorê stand. Lê, her du bira bi hêsanî ji hev ne geriyan. Gel bû du tîş : tîşekê hevaltiya Pelas dikir, tîşa din jî bû hevalê Erduwan. Ji bo lihevanîna her du biran tu çare peyda ne bû. Ceng û pevçûn bi salan dirêj kir. Ji bo vê yekê, xwehermenda Aşkaniyan qels ket, perîşan bû.

Erdişîrê Babekî keys xist destê xwe, di ni xûna her du biran da rabû, bi wan ra ceng kir, leşkerên her du biran jî şkandin. Erdişîrê Babekî Tac û Text kire destê xwe. Bi vî awayî bingeha xwehermenda Sasaniyan danî û dawiya xwehermenda Aşkaniyan di 226 B.Z. da anî.

- 131 -

XWEHERMNDA KU AŞEK BINGEHA wi: DANî XWEHERMENDA PART AN A AŞKANIY AN E ?

Aşek, ji bo ku ji Teberistanê di nixûna Selefkiyan da rabû, dîroknivîsên awrupayî navê xwehermenda nû ku Aşek bingeha wê danîbû kir Part, çima ku bi gotina Awrupayiyan Teberistan welatê Partan e.

Generalê Iskender ê mezin, Sêlêkos , pey Iskender, di 312 B.Z. da, dest danîbû ser welatê Key Kubbadê Kurd. Xwehermenda Selefke li Kurdistanê 87 salan ferweranî kir. Aşek, neviyê Key Kubbadê Kurd, di sala 225 B.Z. da, ala serxwebûnê bilind kir, Kurd giş - Katî 0. Kurtî - xwe da dora Aşek, bi leşkerên Selefke ra ceng kirin, Selefkî ji ber Kurdan reviyan. Kurd imperatoriya Kurdistanê vejand. Kurd ji destê Selefkiyan rizgar bûn 0. navê xwehermenda no. ji bo pîroziya Aşek kir X wehermenda Aş kaniyan.

Hin dîroknivîsên awropayî xwehermenda Aşkaniyan kirine xwehermenda Part. Eşkere xuya ye, ev guhartina nav ne rast e : carekê bingeha xwehermenda nû Aşek daniye. Divê navê vê xwehermenda no. bi navê bingehdarê wê bê gotin. Paşê jî, bitenê Part li dora Aşek ne civiyabûn, Kurdistan giş, Kûtî û Kurtî, baban leşkerê Aşek 0. ketibûn bin ala wî, neyar ji welatê xwe qewirandibûn. Yeka din jî, Partan ne bitenê li Teberistanê cî girtiba. Part li her aliyên Kurdistanê rûdlnlşt.in :

Padîşahê Asor, Salrnanazarê duyim, di sala 759 B.Z. da, gava li Kurdistanê şer dikir rastî Mad û Part hatiye. Di van hengaman da Mad, Part, Mannaî, Kimrî ... li dora Urmiyê rûdinişt.in. Arkêlogan di van salan da kevne rêç ji bin erdê derxistin. Ev kevnerêç nehrevanî dikin ku Part birekî Kurd in.

Di nivîs warên dîrokan da pir nav li Partan danîbûn.

- 133 -

Parth, Partûwa, Partûwah, Parsûwas, Partek ... Ev nav giş hevnav in, giş yek pirs in. Ev nav giş ji pirsa Partas tîş bûne. Mad heft ezbet bûn. Navê yek ji van ezbetan "Partas" bû. Partên dora Urmiyê her gav alîkariya Mannaiyan dikir : di sala 825 B.Z. da, padişahê Mannaiyan, Mînwas, bi padişahê Asor, Salrnanazarê duyim şer dikir. Salmanazar şkest. Di vî şerî da, Araratî, Mannaî, Part, Sît , Kemrî, Amerdî ... giş di bin fermandariya Mînwas, Padîşahê Mannaiyan, da şerê Asor kir û Asor şikand. Ji van

nivîsandinan eşkere dibe ku Part birekî Mad in, ano Kurd in, Kurtî ne. Di wan hengaman da, ji Urmiyê heya Teberistanê belav bûbûn.
Bi guhartina navê Aşkaniyan bi navê Part, ev xwehermend ji kurdbûnê dernakeve. Xwehermenda Part jî ya Kurdan e, xwehermenda Aşkaniyan jî ya Kurdan e.
Lê, Aşek bitenê bi alîkariya Partan ev xwehermend serrast ne kir. Kurd giş - Kûtî û Kurtî - li dora Aşek bûn yek û xwehermenda Selefke wenda kir, imperatoriya Kurdistan vejand (24).
PADIŞAHIY A ARŞAKIY AN (25)
Aşek, di sala 225 B.Z. da, xwehermenda Selefke şikand û wenda kir. X wehermenda Aşkaniyan serrast kir. Di van hengaman da Armînya satrapeke Selefkiye bû, paşê jî bû satrapa xwe he rmenda Aşkaniyan.
Padişahê Aşkaniyan, Mihirdadê yekim, di sala 157 B.Z. da bû Padişah, pismamê xwe Agirşak kire satrapdarê Armînya. Agirşak ku ji ezbeta Aşkaniyan bû, bajarê Erdîşê kire sernîveka xwe. Pey mirina, kurê wî Arşek li şûna bavê xwe bû satrapdarê Armînya û li Erdîşê rûnişt.
Arşek di sala 132 B.Z. da bi xwehermenda Pont ra şer kir û leşkerê Pont şikiya. Kişwerê Pont kire bin destê xwe û tevî satrapa Armînya kire ferweraniyeke nû û navê xwe lê danî. Ev ferweranî bû ferweraniya Arşakiyan.
- 134 -
Bingehdarê vê ferwaraniya nû, Arşek, neviyê Akirşak bû. Ew jî wek pismanê xwe Mihirdad, neviyê Key Kubbadê Kurd. bû. Ano kurê Kurdan bû. Wuha ye. Ferweraniya Arşakiyan ferweraniyeke Kurd e.
PADIŞAHIY A ERDEŞYS
Arşek gava di sala 114 B.Z. da temen payan bû, kurê wî Erdeşîs ket ciyê bavê xwe û ba. padişahê Arşakiyan. Erdeşîs padişahekî mêr û cengawer bû, bi senca (nisbet) mêraniya xwe jî, pirxwaz ba. û ji heftê û du gelan ordiyekê berbihev anîbû. Ev Erdeşîs za. ji bîr kir ku ew ji ezbeta Aşkaniyan e û neviyê Key Kubbadê Kurd e. Ew rabû di nlxûna Aşkaniyan da serkêşî kir. fermanşikenî kir, dirêjî xwehermenda Aşkaniyan kir, bi Aşkaniyan ra şer kir û ordiya wan şikand. Amed {Diyarbekir}, Nisêbîn, Serê Kanî, Ruha ji Aşkaniyan standin. Bajarê Niseybînê ji xwe ra kire Paytext.

Çendaki bi şûnda, vê ordiya ku Erdeşîs ji heftê û du gelan, ji serserî û pêxwasan dabû hev û ku evçend ew kamwer kirlbû, ku evçend bajar û kişwer jê ra veklrandlbûn, di nlxûna wî da serkêşî kir û padişahê xwe Erdeşîs kuşt.

PADIŞAHIY A DIKRANÊ MEZIN

Dikranê Mezin, pey kuştina bavê xwe Erdeşîs, di sala 89 B.Z. da li Textê Arşakiyan rûnişt,

Dikran bi zavayê xwe, padişahê Pont, ra yekdestî danî. Ji vê yekdestiyê ordiyeke xurt berbihev anî, di çend şeran da kamwer bûn, Paşê dirêjî Selefke kir, paytextê wan. bajarê Antakya, vekirand.

Dikranê Mezin, pey vê kamweriyê, bi o rdiye ke Roma şerekî dijwar kir û ordiya Roma şikand.

Dikranê Mezin ku Padişahekî pir payexwaz û bêdad bû, pey van kamweriyan, payexwaziya xwe pir kir û israfa seraya xwe bêtir kir. Di ordiya Dikran da tu bend û best tu nebû. Jixwe Dîkran ordiya xwe ji

hevsiyên xwe gişan, ji heftê û du gelan dabû hev. Di van deman da, ji bo ordiya Dikran wuha digotin:

"Ordiyeke xurt, lê ordiyeke bê ser û bin".

Payxwaziya Dlkran ewçend pêş da çûbû ku bi firazbazî û mezinayî û zordariya Romayê fêris tinazê xwe dikir. Carekê Konsulê Roma, Sokkullas, bi yazdeh hezar leşkerên xwe dirêjî ordiya Dlkran a bi 150 hezar leşker kir û ordiya fêris a Dikran şikand û ji hev jend !!

Di sala 71 B.Z. da, li dora Amed ordiya Roma du caran ordiya Dikran şikand. Ordiya Roma Amed talan kir 0 şewitand. 10 sal pey vê şkestinê, ano di sala 61 B.Z. da, Dlkranê Mezin bi Pompeyûs, fermandarê Roma, ra şerekî giran û pir bi xwîn kir û bi perîşaniyeke dijwar şkest.

Pey vê şkestinê, ferweraniya Arşakiyan pir kêm ket. Roj bi roj qelstir bû. Dawiya dawîn. ferweraniya Arşakiyan wenda bû.

Bitenê ferweraniya Arşakiyan wenda ne bû. Çawa ku em dê paşê bixwînin, Roma, Ereb, Mongol, Tatar û Tirkmen imperatoriya serfiraz a Kurdistanê da ber xwe, leyand, wenda kir. Kurdistan seraser wêran kir. herifand.

Di van hengaman da, çawa ku li hundirê klşwrê Aşkaniyan tevheviyên mezin hebûn, di navbera xanedana padişahî da jî paşimtî (reqabet>, dexsî, dilnexwazî 0 geremolî hebûn. Roma ji vê qelsiya Aşkaniyan keys xist destê xwe, kenarê Deryayê Reş û bakurê Mêzopotamya leyand. Lê Roma bi hergavî ev kişwer di destên xwe de ne digirtin. Li van deran Aşkanî û Romanî du sed sal lîzê "satranc" dilîst. Gava di sala 226 B.Z. da Sasaniyan Kurdistan kir destê xwe û xwehermendiya Sasaniyan serrast kir. îcar ev kozîbazî di navbera Sasaniyan 0 Roma da dest pê kir û 400 sal dirêj kir. Paşê, bi leyandina Islam û Ereban, Sasan jî, Roma jî ciyên xwe ji Ereban ra berdan. Pey Ereban. leyiyên Mongol, Tatar, Tirk 0 Tirkmen li pey hev hatin.

- 136 -

ŞEHRIY ARIY A SASANIYAN

Bingeha Şehriyariya Sasaniyan Erdişîrê Babe kî di sala 226 B.Z. da danî. Erdlşîrê Babekî jî, wek Aşek, ji ezbeta Key Kubbadê Kurd e, ano Erdişîr jî, wek Aşek, Kurd e (26) Û piraniya gelê wî jî, 90%, Kurd e ..

Wuha ye, xwehermenda Sasaniyan jî, mîna xwehermenda Aşkanlyan, xwehermenda Kurdan e, ne ya Faris û Eceman e.

Şehriyariya Sasaniyan 422 sal bi kamwerî û firazbazî Fe rweranî kir. Ji xanedana Sasaniyan 28 padîşah şehriyarî kirine. Erdlşîrê Babekî, Şapûrê yekim, Hurmuzê yekim, Behramê yekim, Behramê duylm, Behramê seyim, Tersî, Hurmuzê duyim, Şapûrê duyim, Erdişîrê duyim, Şapûrê seyrm, Behramê çarim, Yezdîgurdê yekim, Behramê pêncim "Behramê Gurr", Yezdîgurdê duyirn, Hurmuzê Şeşim, Fîrûz, Pela Kubbad, Nûşîrewan, Hurmuzê çarlm, Xusrewuperwîz, Sîrûye, Erdişîrê sêyim, Pûranduxt, Azramî duxt, Ferrûxzad, Zerdîgurdê sêyim.

Ji van 28 Padişahan, em dê bitenê şehriyariyên çar padişahên Bergiran binivîsînin. Çar padişahên gewretir û hêjatir ev in : Erdişîrê Babekî, Şapûrê yekim, Şapûrê duyim, Nûşîrwanê dadker (adil>.

ŞEHRIY ARIY A ERDIŞYRE BABEKY

Me li jor jî derbend (qeyd) kiribû, di 226 P.Z. da Erdişêrê Babekî ezbeta Sasaniyan serrast kir. Erdişîrê Babekî jî berî her karî li hundirê welat asayîş (emniyet) tekûz û tebût kir : di hengama şehriyariya Erduwan da, hin

sergerde û tevhevker peyda bûbûn. Wî ew ji meydanê hilanîn. Paşê ji imperatorê
- 137 -
- 138 -
n
m
Roma, Iskender Sêwer, xwest ku çi erdê Keyaniyan ku di gevera Asyayê da ne û îro ketine bin destê Roma divê ku Roma van ciyan giş vegerîne ji Sasaniyan ra. Û pir ne ajot, Erdişîr dirêjî Romayiyan kir. Imperator Iskender Sêwer bixwe fermandariya leşkerê xwe girt ser xwe û bi ordiyeke pir xurt li Sasaniyan wergeşt (rnuqabele) kir. Ordiya Sasan şkest û Mêzopotamya seraser ket destê Roma : 233 P.Z.
Erdişîr ji vê şkestinê gelek êşiya û pir li ber xwe ket, sond xwar ku tola xwe ji Roma bistîne. Erdişîr ji bo sazandina ordiyeke xurt û mezin dest bi xebtûkoşê dijwar kir. Heft sal, bê rawestan, ji bo pêkanîna ordiya xwe ji dil û can kariwer bû.
Lê çerxa felekê bişkê ! Erdişîrê Babekî ne giha miradê xwe, di sala 240 P. Z. da temen payan bû.
ŞEHRIY ARIY A ŞAPOR:E YEKIM
Şapûrê yekim, pey mirina bavê xwe di sala 240 P.Z. da, li ser Textê Sasaniyan rûnişt. Şapûr berî her tiştî karûbarên kiş werî, dadkerî û diravwerî çêtirandin (lstah) û tekûz kirin. Paşê, ket pêşiya Ordiya xwe ku bavê wî bi xebteke germ û bê aram, di heft salan da, anîbû meydanê. Dilxwaz 0. armanca Şapûr ev bû : tola bavê xwe vegerîne, ordiya Roma bişkîne. Mêzopotamya 0. deverên ku di destê Roma da ne ji wan bistîne, welatê xwe paqij bike û tola kevnare ya bav 0. kalan ê Keyaniyan bistîne. Şapûr bi dilxwazeke germ 0. tin, bi awakî nosûr, dirêjî ordiya Roma kir.
Imperatorê Roma Gordiyan 0. serleşkerê wî Fîlîp bi ordiyeke pir mezin 0. gellek xurt li Şapûr wergeşt. Di gellek meydan-cengan da, Şapûr ordiya Roma şkand. Lê, Gordiyan bê aram ji Roma leşkerên taze anîn 0. umîda xwe ji karkirina cengê ne dibirî. Lê di demeke nazik a cengê da Serleşkerê Roma, Fîlîp, ji mezinê xwe ra nankorî kir, bi bedbextî Imperator Gordiyan kuşt, xwe imperator bang da 0.

- 139 -
Sasaniyan:
Splendeur des Sassanides, Muzeya Qralî ya Brukselê. - 140-
bi dijwarî şer kir. Çi fayde ! Şapûr 0. ordiya Sasan, ev cengawerên Kurdan, ev çêjikên qehreman û şêran ne yên şkestinê ban. Dawiya dawîn, leşkerên Fîlîp li ber êrîşên Kurdan xwe ranegirt, şkest, bela bela ba 0. Fîlîp reviya Romayê.
Şehriyarê Sasan, Şapûr, Mêzopotamya, Ibîrya, Armînya 0. Kapadokya, giş ji Roma bi şûnda standin. Q Şapûr bi evçend jî qîma xwe ne anî, Antakya 0. Hums ji Roma stand: 244 P.Z.
Şehriyarê Kurdan Şapûr bi pêdarî 0. xurtî ku xurê (layiq) Keyanan e, di kişwergiriya xwe da tim pêşve ço. 0. demand (dewam) : Kilîkya (Adana) 0. pir ciyên Sûrlya vesendin.
Pey van kamweriyên gewre û hêja yên Şapûrê fêris, di sala 260 P. Z. da, Valaryan, imperatorê Roma, xwest ku rada ra (manî) kişwergîriya Şapûr bibe. Loma. bi leşkerekî pir giran derbasî Asyayê ba. Şapûr ji dil xwaza Valaryan pir za agah baba. Tavil, bê wendakirina bîstekê, Şapûr ordiya xwe ya amade hilanî û pêrgiya Valaryan bû. Her du neyar li deşta Ruhayê gihîştin hev. Meydancengeke pir xwînrêj 0. dijwar çê ba ! Ordiya Şapûr ordiya Valaryan şikand, ji hev [end, perîşan kir û Şapûr neyarê xwe Valaryan dîl girt.
Şehriyarê Kurdan Şapûr, pey vê pîrozbextiya gewre, 11 salên din jî jîndariyeke pir mezin 0. bextiyar derbas kir. Di sala 271 P. Z. da temen payan bû.
ŞEHRIY ARIY A ŞAPOR~ DUYIM
Şehriyarê Sasaniyan, Şapûrê duyim, kurê Hurmuzê duyim e. Di sala 310 P.Z. da, gava bavê wî temen payan ba, hêj ew ne hatiba cihanê. Piştî çend mehan. dema ku ji diya xwe bû. giregirên Sasanî vî şahzadeyê nazenîn bi navê Şapûrê duyim şehriyarê Sasaniyan bang kir.
Di zarotiya Şap ûrê duyim da, rîsipiyên Sasanî kargerîniya imperatoriya Sasan kir. Di hengama
- 141 -

zarotiya Şapûrê duyim da, Iraq, Mêzopotamya Ibîrya, Armînya, Kapadokya ... hemî aliyên roavayê imperatoriya Sasaniyan giş di nav tevheviyê da bûn. Ji alîkî imperatoriya Roma, ji alîkî din jî hawişên reng bi reng ev welatê bedbext wêran kiribû.

Şapûrê duyim, dema ku bû xort û celewa imperatoriya kurd kire destê xwe, di demeke hindik da sergerde û tevhev kerên ziyankar şerde û zîbade (terbiye) kirin û ji meydanê rakirin. Ordiya xwe rind karûbar kir, mestir kir. Leşkerên wî giş di bedenbazî 0. miqlaciyê da hunerwer bûn. Şapûr 0. serleşker û fermandarên wî baş baweriya xwe anîbûn ku ev ordî hempeyker, hemnîgara ordiya Keyaniyan e. Ordiya ceng û şeran e, ordiya doz û tolan e.

Şapûrê duyim, Şapûrê lawîn, dê îcar Roman ji axa Kurdistanê bike der û Roman ji nişimanê Kurdan biqewirîne. Êdî roja hejmardanê hatibû. Şapûr êdî bi Roman ra hejmardaniyê dê bikira.

Şapûr cara pêşîn bi Roman ra di hêşiyên Çiyayê Şengalê da şer kir. Di êrîşa pêşîn da ordiya Roma pêdarî ne kir, ji ber Kurdan reviya. Şapûr heya Nisêbînê da pey Ordiya Roma, Nisêbîn dorpêç kir. Di hengama dorpêçê da, Imperatorê Romayê, Kostantînê duyim, bixwe bi ordiyeke giran derbasî derya bû û hat gaziya Nisêbînê. Kostantîn bi Şapûr ra çend şerên mezin çê kirin, ji van şeran tu derjê (netîce) ne ket destê wî, paşpaşkî vegeriya Romayê. Lê pey Kostantîn, imperatorekî din, Imperatorê nû Y olyanos, bi ordiyeke hîn mestir derbasî Asyayê bû. Bi Tudmur û bi Erebên dora wê ra yekdestî danî û xwe hîn xurtir kir. Di şerên destpêkê da, ordiya Şapûr heya Mûsilê xwe bi şûnda kişand. Lê, Şapûr ev paş paş kî bi hozanî û konetî çêkirin. Şapûr bi pevçûn û xerpişkên cî cî û biçûk bi neyarê xwe ra çîtlîskî dikir û bi vî awayî dem 0. gav kar dikirin. Şapûr ji van şepan (*) behremend dibû û li ciyên dûr ên pêşanî yên cengê leşkerine taze berbihev dianîn û amadeyê şer dikirin.

- 142 -

Ol Û hunera Sasaniyan : nimêjgeheke zerdeştî ku tê de agir dihat dadan. Splendeur des Sassanides, Muzeya Qralî, Bruksel. Di dîroka hendesê de, ev cara pêşîn bû ku avahî çarkoşe

û li ser wê qubbeke gilover dihat çêkirin. Piştî Sasaniyan, Filleyên Yûnanî (Bîzans) dêrên xwe û Erebên Misilman mizgeftên xwe bi vî stîlî ava kirin.
- 143 -
Gava ku Şapûr ev leşkerên xwe yên nû û taze .tekûz û tebût kirin, ew anîn meydana cengê. Yolyanos gijotiya (wexamet) paşhatiya xwe rind nas kir, aşîtî xwest. Her du şehriyar, Şapûr û Yolyanos, li hev hatin. Nisêbîn ma ji Sasaniyan ra, Diyarbekir bû ya Roma. Lê pir ne ajot, şer ji nû da dest pê kir. Şapûr dirêjî Diyarbekir kir, vekirand, şewitand û talan kir.
Di van demand da, imparatoriya Roma bû du tîş : imparatoriya Roma ya Roava û imparatoriya Rohilat. Imparatoriya Rohilat li ber devê geliyê Bosforê <Istanbul Bogazi) bajarek ava kir, navê wî kir Konstantinopl (Istanbûl) û ew bû paytextê vê imparatoriya nû. Paşîkê, vê imparatoriyê navê xwe kire imparatoriya Bîzans û ji imparatorên wê ra jî digotin Qeyserê Rom "ûrum".
Şehriyarê Sasan, Şapûrê duyim, gava Diyarbekir vekirand, li Istanbûlê Qeyserê Rûm rûniştibû. 0 îcar dora êrîş û şerê Qeyserê Rûm bû. Qeyserê Bîzans, Qeyserê Istanbûlê, bi sed hezaran leşker ve, bi ordiyeke giran ve derbasî derya bû û riya Amed da ber xwe, ber bi Kurdistanê hat. Pêş darên Kurdan ji mêj ve ji van tevger û gertevan haydar bûbûn û şehriyarê xwe agah kiribû.
Şapûr tavil têgihîşt ku nêrû (quwwet.lên Qeyserê ûrim ji yên wî gellek caran pirtir in, bi wan ra pêsîr bi pêsîr şer nabe. Divê bi konevaniya leşkerî, bi hostatiya stratêjî û taktîkan şer bike. Jixwe berî çend salan Şapûr leşkerên sedhezaran ên imparator Yolyanos bi hunerweriya leşkerî. bi pisporiya stratêjî şikandibû, perîşan kiribû û Nisêbîn û Diyarbekir jê standibûn.
Icar dora Qeyserê ûrim e : Şapûr piraniya nêruyên xwe, bingeha ordiya xwe ber bi jêr şand. Sed hezar leşkerê Şapûr hêdî hêdî ber bi jêr bûn, bê lez û bê west riya Medayinê girt. Şapûr bi çend hezar siwarên miqlac û çerxîbaz, gurz li ser milan, şûr li nav piştan, li pêşberê sed hezaran leşker û pehlewanên Qeyser ên ûrim rawestiya.
- 144 -

Şapûr, neviyê Zal û Rustem, çêjikê Key Kubbadê Kurd, Key Aksar, Kûrişê Mezin û Key Behmen bi çend hezar siwarên xwe yên bijare, bi gurz û şûran, bi rim û tîran û bi kemendan karûbarkirî, her roj berî rohilat, berî sipîtala sibê, wek baz û êloyan dirêjî refên kevok û kewan dikir, êrîş dibir ser siwar û peyayên Qeyserê ûrim. Van sedhezaran leşkerên ûrim ji hev tîşûtîş dikir. Ji Ûrtman pir kuşt, pir jî birîndar kir. Ji Kurdan jî yekayek kuştî çê dibûn, yek birîndar jî dibûn. Ma ev ne şer û ceng e ? Di şer û cengan da. kî guh li kuştî û birîndaran dide ?

Ev çend hezar siwarên bijare û padîşahê wan Şapûrê qehreman Û çend fermandarên gernas ên yegane di nav xwe da dor kir, şer Û ceng sar ne dikir, her roj ji sibê heya êvarê dikuşt û şer dikir. 50 roj bi vî awayî pevçûn û xîrplşkên xwe sar ne kirin. 50 roj ji sipîtayiya sibê heya tarîtiya êvarê, bi gurz û riman, bi şûr û tîran û bi kemendan, diajotin ser cengawerên Qeyserê ûrlm, bîn ne dida wan, ew diwestandin, diêşandin. birîn dikirin û dikuştin.

Rojekê. serê sibê pir zû, hêj ku tarîtiya şevê ne çûbû, Kurdên ingirî, wek gurên dev bi xwîn ên meha Sibatê, şebxwîn bir ser neyarê xwe : carna li dora neyarên xwe zîz dibûn, carna wek pîj û xenceran di nîvê germîçanka wan da dlçlkiyan, ev leşkerên sed hezaran tîştişî dikirin, ji hev dijendin, tu bîn û asûdegî ne didan wan.

Her sibe. Şapûr û çend hezar bijareyên wî bi rohilat ra. bi tîrêjên tava sibê ra, berên xwe didan rojê û ji Xudan û Yezdan û Hurmuz ra spas dikir.

Şapûr, ku hergav di pêşiya siwarên xwe da, gurzên şahane di destan da, wek piling û şêran dlqûriya û dirêjî neyaran dikir, dikopand û dikuşt, ji siwarên xwe ra şop. rê û rêçan vekirin. Hêj birîn ne bûbû, geware (durusten) bû. Ji siwarên wî yên bijare jî kuştî û birîndar kêm bûn ! Spas ji Hurmuz ra !!

- 145 -

Ev cenga Şapûran e, ev cenga mêran û şêran e. Bi vî rengî, bi vî babetî 50 roj ajot.

Di van 50 rojan da, Şapûr û bijarên wî ji alîkî ceng û pevçûn dikirin, ji alîkî jî ber bi Medayin dişemitîn: deşta Diyarbekir ji zû da berdabûn, Nisêbîn û

Mûsil bi şûnda hiştibûn, nêzîkî Medayin dibûn. Sê rojên karwanî jê dûr bûn.
X wejber 50 rojên ku ordiya Şapûr jê cuda bûbû, berê xwe dabû Medayinê, padîşahê xwe, fermandarê xwe yê gewre bê peyam ne dihişt. Padîşah her roj ji bûniş û gerteva ordiya xwe agahdar bû. Her roj nûçe û peyman didan û distendin. Şapûr her roj bi birîde (postelyan ferman û rêwerz (taltmat.lên xwe ji ordiya xwe ra dişandin. Ordî jî bi xwezişa (mûclb) fermana Şapûr di nêzîkayiya Medayin da deverên stratêjîk digirtin û livger (hareket.la taktîkî ya xwe jî bi dilxwazî berbihev dianî.
Şapûr, gava sê rojên karwanî nêzîkî Medayin bû, bi xwezişa buxuşjimar û taktîka xwe êdî diva bû ku lîza xwe ya dawîn bilîze : wê sibê, wek her rojan, bi sipîtayiya rojê ra, Şapûr dîsa da pêşiya siwarên xwe yên bijare û êrîş bire Ûrlman. Siwarên Qeyserê ûrlm wê rojê ji her rojan bêtir şer dikir û tu şop û rê ne didan Şapûr. Şapûr ev tişt kire behane û berê siwarên xwe serbijêr kir 0. ber bi Medayin reviya. Ûrlm got qey Şapûr şikiya, tirsiya û bi rastî reviya. Qeyserê Bîzansê bi hezaran siwarên xwe va da dû van revokan.
Şapûr reva xwe sar ne kir. Bi yek bînê ajot Medayinê. Şapûr û siwarên wî yên bijare ji Ilrlman pir dûr ketibûn. Qeyserê Ûrtman bi hezaran siwarên xwe va ketibû pey Şapûr.
Ji wî tirê ew dê Şapûr û siwarên wî yên bijare bi hêsanî dîl bigre. Lê, Şapûr û siwarên wî yên bijare wek baz û başbaşikan difiriyan, wek xezalan bi çindikan baz didan û wan zû, pir zû, xwe gihand Medayinê.
Ordiya Şapûr ciyên stratêjîk girtibûn, bendewarên

neyarên xwe, bi werzanî û gerwerziyan (manewra) kariwer bûn.
Şapûr û siwarên wî yên bijare gava ku gihîştin Medayinê, ew û hespên wan bê tab û tûvan bûn. Riya sê rojên karwanî, bê xwarin û bê razan di bîhnekê da hatibûn. Hezaran kes baz dan, hatin pêşiya van mêrxasan û pehlewanan. Tavil zîn ji hespan kirin, bi naz û niwaziş û mizdan li dora hespan geriyan, xweydana wan pak û paqij kir, li pêşiya wan ka û ceh û nefel tijî kirin. Şehriyarê gewre, qehremanê yekta û siwarên wî yên bijare û gurz, kop û şûrhingêv rext û çek û kinc ji xwe kirin, bi ava germ şa bûn

û bi destê nazenîn û nermîn ew şuştin, miz dan û niwazîxandin, kincine nû û paqij li wan kirin, ew bi goşt û xwarin û nan û çeşniyan têr kirin û giş xistin nav nivînên germ û nerm, di xewa şêrîn ve kirin.
Qeyser û hezaran siwar û sed hezaran leşkerên wî dabûn ser pişta şehriyarên Kurdan û siwarên wî yên bijare. Lê Qeyserê ûrtrn siwarên Kurdan zû ji ber çavan wenda kirin. hespên vana wek hespên ji bê bûn, mîna refê çivîkan zûka ji ber çavan wenda ban. Qeyserê ûrim bi zor di roja çaran da li pêş Medayinê xuyanî kir. Deşt 0. Newal û Mesîl bi leşkerên Qeyser tijî bûbûn. Lê roşîmana (hal) Qeyser û leşkerên wî ne tu roşîman ba : ji riya dirêj êşiya bûn, westiya bûn, kêmxew bûn, nîvtêr û' nîvbirsî bûn.
Şapûrê stratê], Şapûrê qehreman û miqlac û pehlewan bi siwarên xwe yên bijare û dilîr û mêrxas, bi fermandarê yekta 0. bêheval têr razabûn, têr xwaribûn, west û êşa 50 rojî ji bîr kiribûn, bûbûn ter û taze, xurt û zîwer û çeleng.
Du roj bû, Şapûr bi serleşker û fermandarên xwe va li pêşanîceng, li nav leşker digeriya, bi xebtûkoşên cengê kariwer diba.
Me berê dîtibû, Şapûrê duyim pir caran ordiyên irnparatorên Roma çawa şlkandlbûn û çawa ji hev

Ji hunera Sasaniyan : firaqek ji zîv : di nîvê wî de tawûsek û li dora wî jinên muzîsyen.
Splendeur des Sassanides, Muzeya Qralî, Bruksel.

jendibûn. Şapûr îcar jî ev bobelat anîn serê Qeyserê ûrim : ordiya Qeyserê Bîzans a ku gihîştibû dora Medayinê pir bê tab û derbeder û perîşan bû. Şapûr jixwe ji bo vî tiştî 50 roj koşiyabû. Şapûr pir qenc ponljîbû, gellek qenc buxûşa xwe kiribû. Şapûrê pehlewan 50 roj xwe û can û rewanê xwe û çend hezar siwarên xwe ji bo vê demê heba kirin. Şapûr bi gutlek siwarên bijare 50 roj şerê sed hezaran leşker kiribû. Dawiya dawîn plan û xapên Şapûr meywedar bûn. Şapûr gihîşt dilxwaza xwe. neyarê xwe xist tora xwe.

Şapûr ji Qeyser ra bîn û dem û şep ne dan. Bi leşkerê xwe yê ter û taze û jînde êrîşeke dijwar bire ser sedhezaran leşkerên Qeyser. Êrîşên han ji êrîşên şêran, şepalan, pilingan û boxan dijwartir bûn. Ev şerê xwînrêj pir dirêj ne kir. Leşkerê Qeyser bi hezaran kuştî û birîndar û dîl dan û ji hev belabû. Qeyser reviya. bi zor xwe gihande Istanbûlê.

ŞEHRIY ARIY A NûşÎRW ANÊ (ADIL>

Nûşîrwan, şehriyarê Sasaniyan, padîşahê bîstim ê Sasaniyan e. Nûşîrwan hêjatir û pirfiraztirê padîşahên Sasaniyan e.

Nûşîrwan di sala 531 P.Z. da li ser textê Kurdistanê rûnişt. Ji mirina wî heya îro. ano heya sala 1972. 1372 sal derbas bûne. Gel vê yekê, dadkeriya wî û comerdiya wî destanê her zimanî ye.

Nûşîrwan çiçend bi dadkerî û comerdî û enzanperweriya xwe bi navûdeng e, ewçend jî bi kişwer û bajargeriya xwe jî bi navûdeng e.

Nûşîrwan bi Ilrlman, bi Tirkan, bi Hindiyan û bi hernsiyên xwe yên din ra pir şer kiriye. Pîrozbext û kamwer bûye û bi vêrastî şayesteyê bernavê "Mezin" bûye.

Nûşîrwan Şam, Ambar, Qafqasya veklrandine, sînorên xwe ji Hindistan. Tirkistan heya kenarê Deryayê Sipî fireh kirine.

- 149 -

Di sala 562 P.Z. da, Qeyserê Istanbûlê Yustiyanos ordiyeke giran hilanî, ji derya derbas bû û êrîşî ordiya Nûşîrwan kir. Lê, di destpêka şer da ordiya Qeyser şikiya, ji binî da wenda bû. Qeyserê ûrim neçar bû ji bo pêncî sal, 30.000 zêr di salê da, bac bide Nûşîrwan. Nûşîrwanê Adil di sala 579 P.Z. da ronakrewan bû.

Gewremerd "wezîr"ê Nûşîrwan, Buzurcumhûr, bilindkesek bû. Hozan, hoşîmend û pir karsaz 0. karaşîna bû. Dema xwe bi Nûşîrwan ra derbas kir û di van kamweriyên navdar da xudan pare, homan jê xweş be.

Di hengama Nûşîrwanê Mezin û dadmend "Adil" 0. gewremerd "wezîr"ê wî Buzurcumhûr da, Kurdistan bi şehrevanî, bi nê rûmendiya xwe navûdeng dabû, mezinatiya Imparatoriya Kurdistan di wan deman da digihîşt felekan.

Sasaniyan ji rojên bertir sînorên xwe li aliyê rohilat 0. li aliyê bakur gihandibûn sînorên hengama Keyaniyan. Ev sînor bi gellek kamwerî di

destên xwe da digirtin. Lê, li aliyê roava xwehermendeke nû ya Roma peyda bûbû. Di van deman da xurtirê xwehermendên cihanê Roma bû. Sasaniyan û Roma her gav di şer û ceng û xerpişandinê da ban. Ev her du xwehermendên mezin Jorjiya, Armînya, Pont, Kapadokya, Lîdya, Mêzopotamya nikaribûn di navbera xwe da par bikin.
Carna ordiyên Sasaniyan xurttir derdiketin û Roma heya Deryayê Reş diajot û ev kişwer giş jê digirtin, dikirin bin destê xwe. Carna jî berovaj Roma xurttir derdiket, ev kişwer distandin.
Gel vê yekê, xwehermenda Sasaniyan di pir deman da ji çiyayên Qefqasan heya Yemen, Anadol, Sûriya, Filistîn û Misr vekirandlbûn. Di vê Imparatoriya Mezin da şahinşahî dikir. Gava Islam derket meydanê, dawiya van şer û keşmekeşan hat. Kurd û Roma ji hev geriyan. Meydan ma ji Islamê ra !! Emperyalîzma Ereban ev welat giş kirin bin lingên xwe.
- 150 -
Di hengama Yezdîgurdê şeşim da, di 652 P.Z. da, Xelîfeyê duyim ê Islamê, Omer Ibn Xettab, di bin fermandariya Se'd Ibn Ebî Weqqas da, ordiyek şand ser Sasaniyan. Vê ordiya Ereban dirêjî Sasaniyan kir. Li navbera Sasaniyan 0. Ereban du şerên dijwar çê ban : Qadisiye 0. Nehawend. Ordiya Yezdîgurdê bedbext di her du şeran da jî şkest 0. perîşan ba.
Ereb Imparatoriya Kurdistanê giş leyand 0. da ber xwe. Welatê giranbiha 0. şêrîn 0. hirazbaz ê Katî 0. Kurtî 0. Perîsan ket bin destê Ereban !
- 151 -
KURDISTAN DI HENGAMA LEY ANDINA EREBAN DA
Omer Ibn Xet.tab, Xelîfeyê duyim ê Islamê, di sala 15 ya Koçbariya Pêxember da, ano di sala 637 P.Z. da, di bin fermandariya Se'd Ebî Weqqas da, ordiyek şand ser xwehermenda Sasaniyan. Di navbera Sasaniyan û Ereban da du şerên giran çê bûn : şerê Qadisiye û şerê Nihawend. Di van her du şeran da jî leşkerên Sasaniyan şkestin û perîşan bûn !
X wehermenda Sasaniyan, pey van her du şeran, bicarek wenda bû. Padîşahê Sasaniyan Yezdîgurd hat kuştin. Pey perîşaniya ordiya Yezdîgurd, ji Parisan tukes îcar jî xwe ne da pêş û bi Ereban ra şer ne kir. Carek din jî di nuxûna Ereban da mêrên Ecem dest hilanî, dilopek ji xwîna

xwe ne rijand, tavil bû, Islam (27) û "eger xahî selamet der kenar est", ano "eger tu rehayî {rehetî> dixwazî, li kenarê rûnê", got û li quncikê rûniştin.
Lê Kurd. ku movika pişta xwehermenda Sasaniyan bûn û ji 90%ê gelê Sas anê ban, sî sal bi Ereban ra şerine dijwar kirin. Belê, gava Paris û Ecem li mala xwe rûnişt.ibûn û bi tizbî û nimêjan kariwer ban, Kurdan sî sal bihn ne da xwe, koşiyan, xerpişîn, ceng kir, wek çeman xwîna xwe rêt.
Bi rastî, şerê Kurdan bi Ereban ra pir dirêj kir. Li pêş Ereban sê sed sal pêdarî kir. Di hengama Ebbasiyan da jî Kurd du sed sal cî, cî şer kir.
ŞERÊN ŞEHREZOR Q PAWE
Pey şkestina ordiya Yezdîgurd, di imparatoriya Sasaniyan da cengine yeman, li Şehrezor û Pawe, çê ban. Xelîfeyê duyim, Omer Ibn Xettab, di sala
- 153 -
18 ya Koçbariya Pêxember da, ano di 640 P .Z. da, ji nûva du ordî şandin ser Kurdan - Ecem û Paris islam bûbûn, li mala xwe rûniştibûn - loma ev her du ordiyên Ereban ji bo Kurdan şandin. Ordiya yekim a Ereban di bin fermandariya Imam Hesen, Hazîqe î Ye manî Qasêrn Ibn Ebbas, Ebd Ibn Muttelib bû. Ordiya duyim a Ereban bi fermandariya Abdullah Ibn Omer, Ebû Ubeyd El Ansarî bû.
Ordiya yekim dê biçûya ser Kermanşah, Hemedan, Rê, Mazenderan. Ordiya duyim jî dê biçûya ser Şehrezor û Pawe.
Ev her du ordiyên Ereban, gava gihîştin Kurdistanê, cengawerên Kurdan ên pêkhatî li hemberê xwe dîtin.
Çend cengên giran û xwînrêj çê bûn. Di destpêkê da Kurdan berra Ereban dan, fermandarê wan, Ebû Llbeyd, li meydana şer hat kuştin.
Lê, Kurd paşê li her alî şikiyan û perîşan bûn. Gava ku Ereban bicarek serdestî li Kurdan kir, rahişt bextreşî û bêdadî, bobelatine mezin anîn serê Kurdan. Zerdeştîbûna Kurdan ji Ereban ra bû behaneke baş. Hertiştê Kurdan - can, dast (mal), namûs - ji Ereban ra fêhll (helal) û herwe bûbû. Pîr û ciwan bilêc kirin, bajar, bajarok û gund şewitandin. Welatê Kurdan seraser wêran kir, dastê Kurdan giş - jîndar û ne jîndar - talan kir : jin, keç

û zaro tevde wek kerî û garanan dan ber xwe û birin. Wan tiştên dilxiras, kirêt û çepel li Şehrezor û li Pawe ji her alî dijwartir kirin (27).
Fermandarê Ereban, Abdullah Ibn Omer, li ser xwestin û fermana Xelîfe Omer Ibn Xettab, li dora Pawe avadaniyên fireh çê kirin. Hezaran keç û bûkên nazenîn û dawpaqij û xudan namûs li van avadaniyan tije kirin. Paşê, li bin serdarî û çavnêriya Meaz Ibn Cebel, Erebên bedewî dianîn teniştên van keç û bûkên Kurdan û dixistin paşllên nazenînan, keçperî û keçxezalan Il
Ev dezgehên rûreşî yên Omer Ibn Xet tab, ev çepeli-

yên bê şermî, bi salan ajot. Ji vê genîtiya dilşewat, bi hezaran zaroyên "bêjî" çê bûn ! Ji van bedbextan êl 0 ezbet hatin meydanê. Îro, êl 0 ezbetên van bedbextan li Pawe 0 li heldorên Pawe cî girtine û jîndariyê dikin 0 ji "dureh" 0 "bêjî'lbûna xwe şermsar in. Îro jî ji bo dadkeriya xurû ya Omer Ibn Xettabê paqij 0 pakrewan 0 pakpeykeriya wî ra nehrevanên candar in !!
Ev cenawurî 0 xwînxwarî 0 gengemarî 0 çepeliyên pûrt.gij 0 mejîderwerger (hercûrnerc) bi daxwaz 0 fermanên Omer Ibn Xet tab çê dibûn. Wî ji Medînê ferman 0 bernave dişandin ! Belê, kirdekarê evçend dujûnî 0 kirêtî Omer Ibn Xet.tab bixwe bû ! Ev Omer Ibn Xettabê navdayî bi dadkerî, rastgerî, dilovanî 0 mihrivanî !!
Omer Ibn Xettab evçend cenawurî, xwînrêjî 0 genîwerî ji bo firaziya Yezdanê pak 0 dilovan, ji bo mezinayiya Xuda, Xudayê tean, kir ! Mirarkerên <Canî) wek Hulakû bixwe mêrkujî 0 xwînrêjî dikirin, lê dest ne diavêt dawpaqijan, xudan namûs ên ferîşteran. Xelîfeyê duyim, Omer Ibn Xettab, ji herkesî çêtir li sûda (mana) Qur'anê agah bû. Wî zanibû Islam ola Ereban e. Loma ji bo belavkirina wê ne dikoşiya. Omer xwîn dirijand, mêrxas bilêc dikirin, ezbet vedimirandin, emperyalîzma Ereban serrast dikir !!
Deverên ku hêzên Ereban ne dlkaribûn xwe bigihîninê, ne tê da bin, her cî, ciyên din ên Kurdistanê ku hespên wan lê dibeziyan, tu cenawurî 0 kirêtî bi şûnda ne hişt. Bêdadkerî, xwînrêjî 0 genîweriyên Ereban bi sedsalan dirêj kirin. Nemaza ji bo belavki-rina ola Islamê, ji zimanê Ereban

pêve tu zimanekî din ne hişt. Ji hezaran salan di vî kiş werî da, di Kurdistana mezin da, di Kurdistana hengama Iskenderê Makdonî da, ji Hindistan ta Sûriya, kurdî zimanê gişkî bO (28). Lê Parlsî, Efganî, Masajêt ... jî hebûn, Axaftina van zimanan giş nadar kir. Kî ji zimanê Ereban pê va bi zimanekî din bipeyiviya, bi cawbir (meqes) zimanê wî bedbextî, bê dilovanî, diçirpand.

- 155 -

Nivîswarên dîrokên kevnare, nemaza niviswarên kevnare yên Ereban, ev cenawurî û çepelî dûr û dirêj nivîsandine.

Pir muxabin ! Îro welatên misilman, mîna Pakistan, Efganistan, Îran, Tirkiye, Erebistan ... , giş bûne peşinxwanên Ereban. Di nivîswarên xwe da, di rojnave û kovar û pelikên xwe da, ev vêrastên dîrokî û ev serhatiyên dilxepêr û dilsûz pir bi kul nanivîsînin ! Nivîsandina van maf û vêrastan nadar dikin ! Ji bo vê ye ku ji 1400 sal virde bobelat û sosretên dilgijok ên mejîhej ku hatine serê Kurdê belengaz tukes jê agah ne bûye. Tukes nizane ji bo bilindiya navê Xwedê, ji bo ola Muhammed, ji bo ola Islamê çi rûreşî, çi şermsarî, çi cenawurî anîne serê Kurdê perkende.

Em dikarin wuha bêjin : hin gernasên dîrokzan û dîroknivîs hene ku ji van rastiyên ku me bi kurtebirî nivîsandin. ji wan ne haydar in, ne dîtine û ne xwendine !!!

Xweşber (tebîî>, fermeriyên Ecem, Ereb û Tirk, ev her sê Imparatoriyên xwînmij en Kurdan, ji bo feşirandin (xeniqandin) û wendakirina Kurdan ling kutane û wehirandine (israr kirine). Rastiya dîrokê bê perwa vedişêrin û, wek di hengama destpêka Islamê da jî, di nixûna Kurdan da her celeb stemkerî rewa dibînin û, ji bo veşartina van stemkeriyên

. cangudaz ji ber çavên cihanê, çi ji destê wan bê dirix nakin.

KURDISTAN DI HENGAMA EMEWÎ Û EBBASIY AN DA

Mt:RXASIY A "EBA MUSLIM"t: XORESANÎ

Pey Omer Ibn Xet.tab, di sala 646 P.Z. da, Osman Ibn Effan bû Xelîfeyê Islamê. Di xebtûkarê xwe da. çewtî çêkir. Kesên Medînê ew kuşt.

Pey Osman Ibn Effan. ji bo bijartina xelîfekî nû, di navbera Ereban da pevçûn û tevheviyên dijwar çê bûn. Dawiya dawîn. Meawiye Ibn Ebî Sufyan bi xap

- 156 -

1. fûtan berra paşimtê xwe, Elî Ibn Ebî Talib, da 0. bû xelîfeyê çarim ê islaman, li Şamê, di 661 da, gihîşt payeya Xelîfetlyê,

Ezbeta Meawiye paşê navê xwe kir Xilafeta "Emewiye". Emewiyan 89 sal xelîfetî kir. Di sala 759 da dawiya wan hat.

Çawa ku di hengama xelîfe Omer da ji Kurd 0. Paris 0. biyaniyan giş ra stemkerî 0. bêdadî dikir, xelîfeyên Emewiyan jî tu kêmanî ne xist, tu mirdarî 0. çepelî ji Kurdan ra dirix ne kirin.

Emperyalîzma Emewiyan 89 sal bi dijwarî 0. bi noyîtî dirêj kir. Emewiyan, çawa ku ji Kurd 0. Paris ra zebûnkerî 0. şikencdariyên nedîtî 0. celeb celeb kirin, wusan jî ji kur 0. neviyên Elî Ibn Ebî Talib ra jî dikir. Loma, ev her du berên hemderd 0. hemneyar gihîştin hev 0. bûn yekdest. Digel givaj û şikenceyên bê awa yên Emewiyan, Kurd 0. Paris 0. ezbeta Elî di nixûna wan da xebtûkoşek zor dikir.

Ezbeta Elî Basra 0. Kûfe ji xwe ra klrlbûn sernîvek. Lê heldorên Basra 0. Kûfa olrêya (mezheb) şîîtî 0. elewîtiyê rast kiribû. Kurdan 0. Paris an jî ji vê berberîtiya Ereban fesal xist destên xwe 0. Partiyên konevanî sazandin (tesîs kirin) 0. dilreşiya gişkî li Emewiyan gurr kir, agirê kînê geş kir ...

Roja ronayiyê, roja Eba Muslimê Xoresanî. Xelîfeyên Emewiyan zor dabûn bêdadiyên xwe, cenawurî 0. mirdarkeriya xwe. Roj bi roj zorkeriyên xwe notir dikirin. Jixwe, bilêcvaniya xwe carê sar ne klrlbû. Lê, ji nişkava, bextruyê xwe ji Emewiyan zîvirand 0. çerxa felekê ji bo wan çep geriya!

X weş mêrek, mêrxasek derket meydanê ! Eba Muslimê Xoresanî, Kurdê niştimanparêz ê yekta ! Pehlewanê çargurçik xuya ba. !

Eba Muslimê Xoresanî ji Kurdên Xoresanê ye (30). Di sala 749 P.Z. da, li bajarê Merû ala rizgariyê rakir. Armanca wî azadiya gel bû. Dixwest ku renckêşan ji bêdadiyên Xelîfeyên Emewiyan reha bike !

- 157 -

Gelê Kurd giş, bi Paris an , bi Erebên şîî û Elewiyan, li bin ala Eba Muslimê Xoresanî civiyan. Ji Xoresan heya Mûsil, Kurd bicarek hevaltiya wî kir.

Eba Muslimê Xoresanî ordiyeke gewre saz kir : berbihev, rapêçayî, bi bend û best serrast kir û dirêjî Emewiyan kir, leşkerên Emewiyan şikand,

ji Xoresan heya Mûsil kir bin destê xwe. Paşê, Eba Muslimê Xoresanî bi Xelîfê Emewiyan ê dawîn, Xelîfe Merwan, ra cengeke mezin li dora Mûsilê kir, ordiya xelîfê jî ji hev jend û belabela kir. Merwan reviya Filistînê. Elî Ibn Ebdullah bi ordiyekê kete pey Merwan û li Filistînê Merwan kuşt, ordiya wî ji hev xist. Di van şeran da, yên ku pir alîkariya Eba Muslimê Xoresanî kiribû, yek jê Elî Ibn Ebdullah, apê Xelîfeyê nû, bû.
Merwan. Xelîfeyê Emewiyan, hat kuştin. Ordiya wî bela bû. Icar dor hat bijartina xelîfekî nû : ji neviyên hezretî Elî. Ebû Ebbas Ibn Ebdullah kir Xelîfeyê Islamê. Navê xanedana wî kir Ebbasî û xelîfetiya Ebû Ebbas li çarmedoran bang kir.
Pey van gertevên bergiran û kuj dil , Xelîfeyê nû ji bo kuştina Emewiyan futû da. Li Şam, Filistîn, Sûriya, Iraq û Kurdistan bi hezaran Emewî kuştin ! Ter û hişk bi hev ra şewitîn : tola Elî, Hesen û Huseyn vegerand.
Di sala 750 P .Z. da. bi mêrxasî û camêriya Eba Muslimê Xoresanî şehriyariya Emewiyan hat herifandin. Li ciyê xwehermenda Emewiyan xwehermenda Ebbasiyan hat danîn.
Germîçanka Ebbaslyan bû Iraq. Bexdad ji xwe ra kir paytext. Di hengama Ebbasiyan da, hişkbaweriya (teassub) Ereban dest bi slstbûnê kir. Kurd û Paris û hawişên din hinek azadî dît û bihna wan fireh bû. Êdî bi axaftina kurdî û parisî zimaê kesî ne diçirpand. Gel vê yekê, hişkbaweriya Islamê bicarek ji meydanê ranebûbû. Ev marê heft serî yê hişkbaweriyê di xew da bû. Cama ji nû da hişyar dibû û dora xwe jardadayî dikir. Nemaza di Kurdistana

navîn da, li Suleymaniye û Erbîlê, cardin xelîfeyên Bexdê pir xwîna Kurd rijand. Li van doran hinek Zerdeştî mabûn. Erebên xwînxwar ev bê gunehan tevde kuştin.
Digel van gertevên cenawurî û çepelî, Kurd, Kurdên Islamklrî, pir caran digihîştin payeyên bilind û dibûn destûrmend (sahlbî imtiyaz) di seraya Xelîfê da. Di ordiyên wî da gelek gewremerd, fermandar, serek û serkanên Kurd hebûn. Ji van payeyên bilind pêva, di erdê fireh ê Kurdistanê da, bê jimar mîrî çêbûn. Ev mîriyên Kurdan bûn xudan kel û burc û baruyan. Paşê, Kurd padîşahî, şahî û şahînşahî jî anîn meydanê.

PADÎŞAHIYA MÎRÊN KURDAN DI HENGAMA EBBASIY AN DA

Padîşahiyên ku di hengama Ebbasiyan û pey wan da serrast bûbûn, bi rêzên demên sazimamyen wan, em dê yek bi yek ji we ra binivîsînin :

Di hengama Ebbaslyan da, heft Padîşahên Kurdan hatin. Em dê berê du dîrokçeyên van heft padîşahan binivîsînin; paşê jî, em dê miriyên Kurdan pêş we bikin.

DÎROKtN HEFT PADÎŞAHIYtN KURDAN DI HENGAMA EBBASIY AN DA

1- Padîşahiya Lorê Mezin di sala 922 P.Z. da bingeha xwe danî. Ereb di sala 652 da Kurdistan leyandibû. Pey leyandina Ereban 170 sal derbas bûbû ku cara pêşîn Kurdên Lorê Mezin serxwebûna xwe ji Ereban bi zora darê xwe stand.

Ev xanedan, ano xanedana Fedlewî, 500 sal bi serxwebûniyeke tumî padîşahî kir. Ji vê xanedanê 35 padîşah hatin.

2- Padîşahiya Axşadiyan

Padîşahiya Axşadiyan di 993 P.Z. da li Şamê serrast

bil. Li Sûriya û li Misrê 40 sal padîşahî kir. Ji vê xanedanê 4 padîşah rabûn.

3- Padîşahiya Dîlemiyan- Peweye

Elî Imad El Dewle ji Kurdên Dilem e. Li Bexdê, di sala 940 da, bingeha padîşahiya Peweye- Dîlemiyan danî.

Ji bo padîşahiya xanedana Pe weye , dîrokzanê osmanî, Sedrî Azam Haqqî Paşa, di nivîs wara xwe da, "Ibrahim Hakki Tarihi", derpêç 7, rûpel 6, 22, 24 da dinivîsîne : "Di hengama Xelîfe Mustafî Bîllah, di 334-338 Hicrî da, Meaz El Dewle Ibn Ebû Şuca' yê Peweye leşker kişand ser Bexdê, şer kir û Bexda bi zora şûrê xwe vekirand û gihîşte payeya Emîr El Umera. Payeya Emîr El Umera sedsalek li ba xanedana Pe weye , ano li ba padîşahiyeke serxwebûnê, ma".

Meaz El Dewle bi standina Bexdê hertiştî kir ê xwehermendê : leşkerî, kiş werî, kenzedarî û her tişt gihîşte destê Meaz El Dewle; ji bo xelîfetan tu çare û fer (taqet) ne ma. Xelîfe bes xutbe dixwend û li mizgeftê dida pêşiyê, di ayinan da dibû mezinê olê. Bi vî awayî xanedana Peweye li Îran û li Iraqê heya hatina Selçûkiyan padîşahî kir.

4- Pdîşahiya Hesnewiyan :

Ereban pey Islamê Kurdistan leyandibû. Hesnewî kurê Huseyn ku yek ji mezinên Şehrezorê bû di sala 981 da ala azadî û serxwebûnê bilind kir. Xelîfeyê Bexdê ordî şandin ser Hesnewiyan, lê Hesnewî her çar ordiyên Xelîfê Bexdê şikandin û ji hev jendin.
Hesnewiyan bingeha padîşahiya xwe di sala 981 P.Z. da li kîşwerên Dernar û Şehrezorê danî. 141 sal di vî kiş werî da bi kamwerî û bi dadkerî padîşahî kir. Paşê Tatar hatin, li şopa xwe tu avayî ne hişt, talan û wêran kir. Padîşahiya Hesnewiyan wenda kir. Ji Hesnewiyan 11 padîşah rabûne.
- 160-
5- Padîşahiya Merwaniyan :
Ehmed kurê Merwan (Nasir El Dewle) di sala 1009 P.Z. da li Amed (Diyarbekir> Padîşahiya Merwaniyan serrast kir. Vi Padîşahî 52 sal bi serxwebûnî padîşahî kir. 80 sal temendirêj bû. Di seraya xwe da hergav 366 nazenîn xwedî kirin. Her 366 dîlber jî xweşdeng û sazende bûn.
Ji vê xadenadê 5 padîşah rabûn : Ehmedê Merwan, Nasirê Ehmed, Seîdê Nasir, Mensûrê Nasir. Padîşahiya Merwaniyan 91 sal ajot.
6- Padîşahiya Eyyûbiyan
Şahê şahan, Selaheddînê Eyyûbî, qehremanê şerên Xaçparêzan. di sala 1177 P.Z. da bingeha şahînşahiya Eyyûbî ya Kurd danî. Kurdistan, Ermînya, Sûrlya, Misr û Yemen di bin destê Eyyûbiyan da bû. Şahînşahiya Eyyûbiyan 305 sal ajot.
150 sal berî şahînşahiya Selaheddîn fileyên Awrûpa Quds vekirandlbû, Filistîn seraser standibû, padîşahiyeke mesîhî di nîvê Islamê da serrast kiribû. Heya ber deriyê Şamê dirêj dikir, dora Heleb û Hums keleşî û nejdivanî dikirin. Dilxwaza Qralê Qudsê û siwarên wî eşkere bû : Sûriya û Msr bistînin û di nîvê Islamê da imparatoriyeke mesîhî serrast bikin.
Lê Salaheddînê qehreman, Selaheddînê kurd hat ! Nlgaşa (xeyal) qralê Qudsê ne çû serî ! Selaheddînê kurd ê pehlewan bi salan şerê heft padîşahên Awrûpa kir, ordiyên her heftan jî şikandin !! Selaheddîn bû "Pîrozbext" û serfiraz !
Pey nivîsandina van çend rêzan ji dîroka Selaheddîn ku engîza (sebeb) firazweriya (lhtlşam) Islamê, nemaza ya gelê kurd e, em dikin hinek zanînên dîrokî yên pejilandî (mufassal) jî binivîsînin.

Ji bo ku em vê dilxwaza xwe bi awakî qenc 0. durust bibin serî, me gellek nivîs warên (kitab) dîrokê yên ku di gihaja (heqqê) Selaheddîn da
- 161 -
Selaheddînê Eyyûbî
- 162 -
hatine nivîsandin xwendin : bi kurdî. tirkî, farisî, erebî, fransizî û ingilîzî.
Me ji nav van çend nivîs waran a dîrokzanê fransiz, Albert Champdor, pêşirand (tercîh kir>.
Mîrza Albert CHAMPDOR li ser cengên Selaheddîn û Xaçparêzan û li ser xuy û wafirên (exlaq) berguzîn (mumtaz) ên Selaheddîn û di gihaja jîn û tevgerên wî yên vîjetî (xusûsî) da û li ser nêrûmendiyên (menaqlb) gûrîbaş û bilind ên wî zanînên pir pejilandî nivîsîne. Bi xwendina nivîs wara Mîrza Albert Champdor baş eşkere dibe ku ew fillekî olparêz e û kato1îkekî hişkbawer e. Gel vê yekê, Mîrza Albert hîç dudilî (tereddud) ne xistiye nivîs wara xwe ya 350 rûpelî, bi nêrûmendiyên berguzîn û bi wafirên bilind ên Selaheddîn tije kiriye.
Tiştekî din ê hêja jî heye : Mîrza Albert Champdor ji bo nivîs wara xwe navekî bercuste (mustesna) lê kiriye : navê nivîs wara xwe kiriye "Saladin, le plus pur hêros de I'Is lam", ano "Selaheddîn, xurûtirê (safîttr) qehremanên Islamê" . Yekî din jî : di derpêça nivîs warê da, bi tîpên girs ev peveka (cumle) ha nivîsandiye : "Saladin, aprês Mahomed, la plus haute flgure de l'Islam".
"Saladin", nivîs wara Albert Champdor, rûpel 32 :
"Hengamekî (dewr) tije bi şan û firazwerî (şeref) dest pê dike. Ji îro pêda navê Melik Nasir guherî, bû "Selaheddînê Mezin". Selaheddîn di şepên (firset) bi fesal û bi endiz (munaslb) da xurtî û zoraweriyeke mezin kire dest, û ji cihanê ra aş kart ku ew kare gellek kisse (rnesail) û gertevên pir zor û bergiran bibe serî; û ew xwehermendkesekî (şexsiyeta dewlet) yekta ye û bi nejadekî derberz (fewqelade) hatiye aferandin",
"Heya wê rojê Selaheddîn ji rêgeha cengaweriyê ra tu berxwarî nîşan ne dabû, heya ewçend ku di geştecenga Misrê da, ji bo ku hevaltiya mamê xwe Şêrkuh bike, mamê wî bênev (mecbûr) bûbû ku ji Selaheddîn ra zordarî û şûrgivajî nîşan bide. Ji bo

- 163 -
Selaheddîn çêtir û xweştir ew bû ku di aram (sukûnet) û aştiyê da bi kisseyên zanişolî (ilmê dînî) û bi zanişmendiyê kariwer (meşxûl) bibe û neçe şeran, di meydana ceng û pehlewaniyê da çerxbazî neke. Lê, paşê xuya bû ku ew di kargerîniya werzişan (umûr) da serdarekî derberz e û gêndlşwerekî (şexsiyet) bercuste (mustesna) ye".
"Selaheddîn bi baldarî û pêdarî (sebat) xwe girêda xebtûkoşên pir bergiran (muhlm). Wî armanc û riya xwe bi awakî xuyadar û aşkaftî didît : olriya (mezheb) sunnî di Misrê da bi cî bike, herkesî bi pitik û pi tik li rêdarê (qanûn) serflrû bike, bê wendakirina yek duyik (saniye) Xaçparêzan bişkênîne, xurtiya gêndîşa xwe û ya ezbeta xwe sazdar bike, ji bo avayiya welêt konevaniyeke kişwerî (mulkî> serrast bike".
"Li bin penaha Selaheddîn misilmanî dê bigihîje gûrîpaşlyeke (geşbûn) nûjen".
Rûpel 42, 43 :
"Qralê Bîzansê ji Qralê Qudsê ra 220 perçe keştîceng (gemiyên herbê) dan. Qralê Qudsê bi van keştiyan tavil dest bi xebatê kir. Bajarê Dimyatê ku kilîta pehnava Nîl e dorpêç kir (muhasere). Dorpêça Dlmyatê pênc roj ajot. Lê, Xaçparêzan tu havil ne kir. Selaheddîn ji bo Dimyatê çêt.irên leşkerê xwe , lekên Kurdan, bi cî kiribûn. Dorpêçkiriyên Dimyatê bitenê bi herwandina (aqîm) xebatên Firingan qîma xwe ne anî, bi şev û roj ji Firingan ra bîn ne dida, ew diwestandin, kevlravêjên (rnencenîq) dêwasa ku ji Yewnanistanê anîbûn şewitandin".
"Xaçparêzan ku dilîrî (cesaret) û mêraniya xwe wunda kiribûn bêjgotina (muzakere) aştiyê xwest. Li dawiya bêjgotê ziyancengeke (tezmînatê herbiye) giran da, Misr vala kir û çûn".
"Selaheddîn ji van serhatiyan bi serfirazî û bilindî derket".
"Ew rewana parastina Dimyatê bû. Neyarên wî yên hundirî dixwest ji par ra li wî xin. Lê Selaheddîn
- 164 -
bi carekê Misr ji destê wan reha (xelas) kir". Rûpel 46 :

"Selaheddîn gava sî û pênc salî bû, li ser textê şehriyariyê rûnişt û malbata Eyyûbiyan anî meydanê. Êdî xwîneke nû, xwîna Kurd li Islamê ferweranî (hukum) dikir.
Selaheddîn bi tev bûna dîrokê dê biaşkirîne ku ew hêja û şayeste <layiq) ye û di temaşagehê da dê roleke mezin bilîze.
Ferweriyên (hukûmet) Latînî yên Rojhilatê di pêş xwe da dê konevanekî hunerwer (mahîr) û ronak bibînin. Ji vir pêda, di hemberî xwe da ferweranên rojhilatê naçîz û nehêja û ji sûdişa dîrokê ra ku bi bedid (wedî'e) di destê wan da ê ne agah ew dê ne bibin".
Rûpel 48 :
"Pey tev heviyên ku bi kêketin û qelsiya xanedana Fatimiyan li Qahirê çê bûn û pey birçîtî û tîbûnê, pey wergerkên (lnqllab) ku serheng (qumandan) û gerceng (zabit) li pey hev disazandin, pey zorbatî û stemkariyên hergav, pey tevdanên noker û nazenînan li hundirê serayê, Selaheddîn hat.
Selaheddîn bi dilxwaziya xwe ya qenc, di demeke hindik da, tiştên ku bi tevgerên çepel û çewt û xwar ên xelîfeyên Fatimiyan hatibûn meydanê nûvandin û çêtirandin, pojnên çelq û tund ên gel nermijandin û neşimandin (tehwîn), bawermendî da dara û tuwangeran, bazirganî haland (teşwîq) û xurt kir, medrese û xwendegehên nû vekirin, ji bo ewlemendî, aştî, asûdegî û asayişa paytext pir baldarî kir, ji bo vê yekê hindikek dudilî (tereddud) ne kir, tu endiz (tedbîr> û çare şûnda ne hiştin. Misr bi sîdariya Selaheddîn, Mîrê xwe yê nû, gihîşte jîneke candar û teze û bextiyariyeke bê pîvan û meywedar.
Ev kamweriyên (muweffeqiyet) han di pêçpelxaneyên (def terxane) Misrê da bi navbilindî nivîsandî ne".
- 165 -
Rûpel 11 :
Bi vî awayî Misr li bin fermandariya bingehdar (muessts) a Eyyûbiyan a ronak hengameke dirêj û pir gûrîpaş vejiya : li kişwerê Misrê seraser aştî û asayiş cî girt. zanişmend bûn xudan rûmet û çare, û meydana koşişiyê peyda kir. Pîşewerî (senet) û spehpîşe (fennîcernîl) bi azadeiyeke vêrast (heqîqî) bişkivîn û lezûbez pêşve çûn. Xebtûkoşa bazirganî ji nû da dest

pê kir, sermiyan û bermeyweyên (rnehsûlat) biyaniyan bi fira wanî (pir) hatin Misrê.
Di hengama xelîfeyê Fatimî El Edîdê bêkêr û ne hêja da, ji ruyên keşmekeşên civatî û ji vajferwerî (anarşî), ji tunebûn û birçîtî, ji bêdadî û stemkarî (zulm). Misr ku hebûna wê hatibû kujarişê (tehltke) demeke fira wanî û gumrehî û şadimanî ajot".
Rûpel 77 :
"Se laheddîn ji bo pezirandina şehriyariya Şamê tu lezandin nîşan ne dida. Wî ne dixwest ku dilxwaza wî ya wergerandina kurê Nûreddîn (parastvanê wî yê kevn) di nav kesan da dengîn bibe. Wî diçêtirand (terclh dikir) ku pezirandina şehriyariya Şamê jê bê niyaz û hêvî kirin. Bi ravajişên (israr) germûsûr (pir xurt) ên hevalbendên xwe yên Şamê ber bi Sûriya bi rê ket.
Selaheddîn bi heft sed siwarên Kurd Qahirê berda. Ji bo ku dej (kele) û barû (birc) û singerên (şato) dora Sinayê bazresîne (tef tîş) , berê xwe da tengava (mîna. xelîc) Aqebê.
Bê serêşanî ji navberên gilo reyên (post) Firingan û ji pehnava Aqaba derbas bû û di sala 1174 da, roja Sêşembê, di 27 Çiriya Paşîn da ji navberên kesên ku hêj wê gavê jê ra bi çavê qehremaniyê dinihêrt, bi çepik û lîlişan derbas bû, kete Şamê".
Rûpel 81 :
"Dema ku Selaheddîn bi Kurdên xwe va li pêş Helebê xuya bû, bajar di nav avayî, gumrehî û firewaniyê da bû. Wêranezarê ku Tirk di nav pêncî salan da têx kiribûn, ji meydanê rabûbû".
- 166 -
Rûpel 92 :
"Selaheddîn payîzê vegeriya Misrê, di nepeydeya xwe da birayê xwe Tûranşah li Sûriya danî şûna xwe.
Selaheddîn avayîsazê gewre, kar 0 xebtên ku berê çend salan li Qahlrê dest pê klrtbûn rahişte payankirina (lntac) wan.
Tuwandarî 0 xurtiya (quwet 0 qudret) Eyyûbî, ku bingehdarê wî yê pêşîn Selaheddîn e, di dîroka Islamê da hengameke nû vekir : darayî 0 hebûna xwe ya berdest danî peykandinê (mewqî 0 tetbîq) û di meydana ceng 0

leşkeriyê da gihîşte kamwerî û pîrozbextî, Xaçparêz şkandin 0 "Erdê pirfiraz" (muqeddes) ji destê Xaşparêzan rizgar kir.
Di spehpîşeyê da, di avayîsaziyê {mîmarî} da, peyker (saql) 0 nîgarên (neqş) nûjen 0 pirxeml nûvandin (îcad kir). Ji bo wundakirina rêola (mezheb) şîîtiyê, mîna dej 0 baruyan, xwendegeh 0 xaneqah serrast kirin. Van avadaniyên han, ku di konevaniyê da roline mezin dilîst, ewçend navûdeng da ku Prensên Qahirê di navberên xwe da, ji bo lêkirina van avadaniyan, ji hev ra paşimtî dikir. Bi vî awayî bajarê Qahlrê bi avadaniyên gewre 0 xweşhevisandî xemilî.
Selaheddîn bi sernavê xwe dirav da kopandin (derb). Li ser diravan vîneya (sûret, resim) Sultan nigarkirî (rnenqûş) bû, Sultan li ser Text, bi çarmêrgî xuya dibû.
Selaheddîn, gava sî û neh salî bû, li Qahîrê gihîşte şan 0 payeyên pirî hevraz 0 bilind. Gava, cara pêşîn, Selaheddîn hate Qahirê, tukes ew nas ne dikir".
Rûpel 93 :
"Rûpen, Qralê Ermenistana Piçûk, çend deverên Padîşahê Konyayê vesandlbûn (zabt) , Kiliç Arslan, Padîşahê Konyê, ji bo qewirandina van leyandkeran (mustewlî), ji welatê xwe alîkariya Selaheddîn niyaz kiribû. Selaheddîn ku di konevaniyê da huner-
- 167 -
wer e, şandina ordiyeke bitenê ser jimara xwe, li ser qralê Ermeniyan çêtirand. Ev qralê Ermeniyan bi alîkarîkirina Xaçparêzên Awrûpayiyan xudan sûc bû.
Selaheddîn kişwerê Rûpen leyand û pelixand, paytextê wî dorpêç kir û bi êrîşê vekirand (feth), talan kir û bazarîşa (muşarete) xwe ya aştiyê bi zorê da pezirandin. Rûpen erdê ku stendibû - bivê nevê - vegerand û bi ser da ziyancengî sencand (te'yîd).
Padîşahê Qonya ji Selaheddîn ra pir spas kirin û ji Selaheddîn gellek niyaz kir ku ji bo bergaftina (hel lî mesaîl) neliheviyên di navbera Ferweranên (hukumdar> Islam ên biçûk ên van doran da bibe Ferwerde (hekem).
Ji vir pêda, ji bo ku aştiya hergave û gişkî paydar bibe, parastvaniya bilind a Selaheddîn ji aliyê gişî Ferweranan hat pezirandin. Bi vî awayî, li

Anadolê çi kisseyên ku ji bo yekîtiya Islamê karibin ziyandar bibin bi "Ferweriya Y eganetî" ya Selaheddîn bên encamdan.
Qenc xuya bû ku êdî Selaheddîn dê xwe bispêre van mîrên Islamê û Heleb, Şam û Qahirê; û ji vir bi şûnda bi hunerwerî û agahî konevaniyeke pir mezin bilîze.
Selaheddîn di sala 1180 da, li kenarê Ferêt, nêzîkî Crablusê, bi hin ferweran û mîran ra peymaneya (mu'ahede) dostanî girêda. Ev peymane ji aliyê van mîrên jêrîn hat navişandin (imza) : Padîşahê Konyayê, Kihç Arslan; Ferweranên Şengal , Erbelan, Mêrdîn û Diyarbekir; Fermandarê Sipahên Mezin û Qralê Ermenistana Biçûk Rûpen III ku Kurd ew vê paşiyê şikandibû.
Ji bo şan û firazweriya vê aştiya gişkî, êl û hawişên Mêzopotamya beran û kavir ser jê kirin û nan danîn û govend û dîlan gerandin, cêjn û şadmaniyeke zor kirin.
Selaheddîn. pey ku lekên xwe perwendin (izn da), vegeriya Misrê. Weşbestan, ji bo xelat û comerdiya
- 168 -
vî siwarê herasawer ê Xudê, destan dinivîsandin, pesn û aferîn dixwendin".
Rûpel 131 :
"Selaheddîn ferweranê Mûsilê. Izeddîn, li bajarê Mûsilê dorpêç kiribû. Selaheddîn, di dema dorpêçê da, nexweş ket. Bijîşên wî jê ra şîret kir ku biçe Herranê (Urfa), çima ku Herran bi rindî û paqijiya xwe binavûdeng e. Selaheddîn di nivîna bîmareyê da bê tabûtûwan razabû. Ferweranê Mûsllê Izeddîn encumenek şand Herranê, ji bo ku bi Selaheddîn ra "bêjgoya aştî" bikin.
Selaheddîn guh ne da bîmariya xwe. Zordestî li bîmariya xwe kir, encumenê Izeddîn pezirand dîwana xwe. Li şîpanderê mirinê li aştiyê qîma xwe anî. Lê bi Izeddîn aştiyeke wusan çêkir ku goya Izeddîn, mîna dîlekî bi zincîran girêdayî, di bin destê wî da girtî ye. Ji Izeddîn paytextê Kurdistan û Mêzopotamyê stend. Di vî kiş werî da Ferweraniya Eyyûbiyan pê da nas kirin. Rojên înê "Xutbe" bi navê Selaheddîn dê bihata xwendin".
Rûpel 146, 147 :

"Gewretira Kamweriya Islamê li hemberî Xaçparêzan, Hattîn :
Xelîfe, cînişтê (wekîl) Peyxember, di nlxûna Xaçparêzan da koşişceng (clhad) bang dabû. Loma, li Sûriyayê şadmaniyeke zor çê dibû. Tûde giş di gewz Û şadiyê da pûyan bûbû. Erebên koçer ji her alî dikişiyan ber bi Filistînê. Weşbestên (*) Ereban war bi war, kon bi kon digeriyan, ev gertev û peyxamên bergiran li çar nikarên Erebistanê belav dikirin.
Selaheddîn leşkerên xwe yên rêzanwer (nizamî) li bin fermandariya birayê xwe Melik Efdel, li bakurê Hewranê, di nehê Adarê da, di sala 1187 da civand. Melik Efdel ji birayê xwe ferman girtibû ku ji bo geştecengeke (sefer) dirêj xwariş (erzaq) û çekan bide hev. Ev amandişên (hazirî) ku li Şamê çê bûn

li Qudsê deng da. Qralê Qudsê, Guy de Lusignan, dest pê kir bi şorindên (we'iz) homanwer (mubarek) û bi qayîş kêşê xwe, Comte de Tripoli, li hev hat. Bi piraniya dengê gel, leşkerên xwe li Galîlê civandin. Li deşta Sofarê 2.000 siwar û 18.000 peya gihandine hev.
Di vê geştecenga Firingan ku bi lezûbez hat çê kirin da tiştek heye ku divê em di bîra xwe da bihêlin : li bajarên Filistînê û keleyên wan ji jin û zarûk pêva tukes ne ma bû. Belê, Qralê Qudsê kare biangişîne (lddl'a) ku wî li Sofarê bergirantira ordiyên Xaçparêzan daye hev. Lê, eger Kurdê kişwergîr (fatih) kamwer bibe û Qralê Qudsê bişkîne, paşê li ser riya Selaheddîn kî dê şer bike? Qralê Qudsê giş gertevên ku karibûn bên pêşiya wan ne dîtibûn. Serve hata (rnuqedderat) filleyên gûrîpaş û gumrehên Rohilatê di yek meydancengê da lîztin tu caran rêt (efû) nabe".
Rûpel 148 :
"Selaheddîn berî ku rahêle fermandariya slpahê xwe, bi hin paşimtên xwe va dostanî girêdabû : bi Qralê Antakya, Bohêmon, ra, bi riya konevanî li hev hatibû, dostanî girêdabû. Bi vî awayî, sînorê bakurê Sûriyê xistibû bin ewlemendiyê. Loma, Selaheddîn karibû, bitenê, bi gertevên Filistînê karwer bibe.
Selaheddîn di sala 1187 da, di meha Gulanê da, li rohilatê Teberiyê, li dora kaniyên Astara şergeha xwe danî. Li vir, li benda "leşkerên alîkar" (Ihtlyat), ên ku ji Mêzopotamya û ji Misrê dê bihatana, bû. Ev leşkerên

alîkar li bin fermandariyên Mîrên bijare yên rohilatê bûn. Gava ev leşker hatin û li ser hev civiyan, Selaheddîn ew bazres (teftîş) kirin. Ev bazrese çiçend firazbaz (muhteşern) û gûrîpaş (geş) bû ! Çav dlbilblsandln, dil xur û şadan dikirin!
Dîrokzan El lmad vê alayişa leşkerî (resmi geçit) bi vî awayî dinivîsîne : "Deşt û çiya bi piraniya
- 170-
siwarên Yezdan hatibûn niximandin. Şergeha me bi kîlometran dirêj dibû, Şêst hezar leşker di şevekê da li bin ba 0 bager, bazres bûn",
Rûpel 149 :
"Selaheddîn şeva 26/27ê Hezîranê li Xifînê derbas kir. Paşê, ji bo pênc rojan, şergeha xwe rakir 0 bir, li deşta Teberiyê danî. Li 30ê Hezîranê, roja Sêşernbê, ji bo ku li Teberiyê, bajarê şanfiraz , karibe xweş temaşa bike, li ser girekî bilind bi cî bû,
Selaheddîn, di yek deme (saet) da, Teberiyê vekirand. Leşkerên wî bajar talan kir 0 şewitand. Gava gûrlya agir bajêr da ber xwe, Selaheddîn êrîşên beyhûde li kelê dikirin. Jina ferweranê bajêr, Raymond de Tripoli, qedxena (rnudafaa) kelê dikir, radestkirina (teslîm) kelê ne pezirand 0 dizîka merivek şand ba Qralê Qudsê 0 jê lezûbez gazî xwest.
Xaçparêzan li ser kaniyên Sofarê 20.000 leşker civandibûn. Qral, gava peyxama şewatê şûnawerê Teberiye bihîst, encumeneke bergeştmendan (muşawir) civand.
Bêjgoya (muzakere) wê encumenê pir dirêj 0 pir bi hengeme bûbû, Paşê, dengên encumenê bûn du cî, nemaza Raymond de Chatillon 0 Gerard de Ridefort dixwest tavil dirêjî serê misilmanên ku agir berdane Teberiyê bikin. Lê, Raymond de Tripoli pir hoşwer (maqûl) diponijî 0 got : "Divê di kelakela germa havînê da em dora kaniyên avê bernedin, xwe navêjin beyabanên bejavê, xwe ji tînan nekujin l".
Qral ku kêrnmeram (irade) bû, ne karîbû wehrişekê (qerar) bide. Paşê, qral wehrişa xwe da ku li ber avê bisekine. Lê, nîvê şevê serekên ordiyê hatin çarderê Qral 0 ew qîmand (iqna' kir) ku serê sibê zû dirêjî islaman bikin. Ev serek ban engîza (sebeb) wendabûna ordiya Xaçparêzan bi destê Selaheddîn".

- 171 -
Rûpel 152 :
"Çend deme (saet) bi şûnda, bi rohilat ra ordiya Fillan serê kaniyên Sofarê berda, bi rê ketin û berê xwe da mirinê.
Selaheddîn bi dorpêçkirina kela Teberiye fillan dizorandin ku kanî û çêrên Sofarê berdin û ber bi wî bên; û ji alîkî din jî riya gola Teberiyê ji wan digirt û ew dikişandin erdekî hişk û bê dilopek av. Di yekê Temûzê da, du ordî hatin hemberê hev. Selaheddîn gava dît ku qralê Xaçparêzan, ji bo cengê, tê ciyê ku wî bijartiye, ji dilşabûna xwe wuha qêr kir : "Xudê wan dispêre destê min". Sibetirê, kopişa (rnusaderne) pêşîn li Lîbya çê bû, ji serekaniyên Sofarê neh mîl dûrtir. Her du alî jî ji hev ra dilovanî ne dikir.
Behaeddîn ji bo vî şerî wuha dinivîsîne: "Di dîrokên jîlên pêşiyên me da, cengên wek vê rojê tu caran ne hatine dîtin".
Şev hat, herkes çek bi dest, di şergeha xwe da kire sibe. Bûnişa (hal) fillan dibû bûnişeke dijwar û dil kuj , meriv û hesp dest pê kiribû li berketina tîbûnê.
Rojeke germ û bi tîn û kizroke bû. Heyişa avê dikira biqede. Sibetirê bi rohilatê umîdeke fillan mabû : ji navbera misilmanan buhurek vekin û benda dijwar a misilmanan bişkînin. Lê, di vê dojeya sîlik û tavê da, leşkerên Selaheddîn ku li ber rexê avê gewza xwe dikir, şep (firset) ne dane wan. Vê rojê seraser fille di nav ewrên axpîngan da û li pey hev êrîş birin misilmanan.
Behaeddîn ewha dinivîsîne : "Xudê dilê gawuran bi tirs û herasê tije dikir".
Ordiya Firingan ji çar alî ketibû nav çenberê. Ev çenber bê dilovanî, ji berêva teng dibû. Selaheddîn hêj gişî slpahê xwe ne avêtibû meydanê, êrîşa mezin hiştibû ta ku neyarê wî ji tînan bicarekê bêtab bikeve.
- 172 -
Tîravêjên Selaheddîn cama germiçanka neyarê xwe, cama hêlekên neyarên xwe, didan ber tîran. Tîravêjên hunerwer ên Selaheddîn ziyankariyên hovnak (mexîf) çê dikirin. Firing xurtî û mêraniya xwe wenda kirin. Lekekî Firingan xwest ku bireve, giş hatin hûr kirin. "Berşûrmaylyên"

ordiya gûrîpaş a Firingan bi awakî pejmurde hilkişiyan serê girê Hittînê. Qralê Qudsê xwest ku li leşkerê xwe bendûbest bide. Lê beyhûde!
Guzîdetirên leşkerên wî bawermendiyên xwe wenda kirin, bîr ne dibir ku di vî girî da - ku ew hildikişin - dê bêne dorpêç kirin û giş ji tînan, ji birçûnan û ji german dê bimirin.
Filleyên bedbext dest pê kiribû îşkenceyên tîbûnê bikişînin, ev tîbûna ku mejiyê meriv çelq dike û ber çavê meriv reş dike.
Îşev ji fillan hindik kes xew kir, çima ku Selaheddîn heya sipîtayiya sibê ew di tirs û herasê da hiştin.
Paşiya paşîn, roja çarê Temuzê, sala 1187 ku ji gişî filletiyê ra rojeke reş û şîndar bû hilat.
Sultan, ji bo ku dirêjî fillan bike, li benda ba bû, bayê kizrok ku ji aliyê Teberiyê tê. Gava ku ba rabû, giya û istiriyên ku ruyê erdê girtibû, agir berdanê û şewitandin. Şewat zûka girê Hattînê girt. Imadeddînê dîrokzan ewha dinivîsîne : "Fille, ku sê xudanên wan hene gihîştin sê agiran : ê ezmên, ê erd û ê birînê".
30.000 leşkerên Firingan li girê Hettînê wenda bûn. Selaheddîn çardera (çadir) xwe di nîvê meydana cengê da kutta. Mezinên dîl ên cengê jê ra Qralê Qudsê Guy de Lusignan, de Giblet, du Boutron, de Maraclêe, Ofroi de Toron, de Montfferat, Guillaume III û Renaud de Chatillon anîn.
Selaheddîn ev sendin çardera xwe. Li serê çardera wî alek daçikandî bû. Li ser alê bu sîmên zêrîn ev nivîsandin dihat xuya kirin : Selaheddîn, şahînşahê
- 173 -
şahînşahan, kişwergîrê kişwergîran, wek her kesî beniyê Xudê ye û li benda mirinê ye.
Selaheddîn qralê bedbext bi firazbazî pezirand, li aliyê xwe yê rastê da rûniştandin, ew niwazt (teseflî), dilê wî xweş kir, pê ra dest bi peyvê kir, jê ra ava tezî, berfa çiyayê Hemrînê , gulav û xweşav peşvekirin. Qral çend qurt vexwarin, paşê piyale dirêjî Renaud de Chat.illon kir. Tavi1 Selaheddîn ji wergeşk ra wuha got : "Ji Qral ra bibêje, ji vî mêrikî ra ew av dide, ez nadim". Selaheddîn vegeriya, berê xwe da Renaud de Chatrllon û bi dengekî tûj û hişk lê qêriya : "Te pir caran sond xwar û paşê te

peymanşkenî kir; te gotina xwe da, lê tu li ser gotina xwe ne ma. Ji çavnetêrî û ji diravparêziya xwe te pir caran di nîvê aştiyê da peymannav çirandin, sond û gotinan ji bîr kirin". Selaheddîn, pey van pirsan, li ruyê Renaud de Chatillon awirne tûj da û qêr kir : "Xudê, ku ji stemkeran dadê belengazan distîne, tu xistî nav lepê min, Prensê nebekar ! Di nav aştiyê da, bêdadî, stemkerî û zorbatiyên ku te li islaman dikirin bîne bîra xwe ! Çêr û dijûnên ku te li Peyxemberê me dikirin bîne bîra xwe ! Xudê nefrînan li te bike ! Paşiyên gişan, tiştne kirêt ku ji bo Meke û Medîne te xistibûn mejikê xwe bîne bîra xwe ! Ji bo evçend mirarkerî û gendgemariya te, divê sezayê te ez bi destê xwe bidim û sonda xwe bînim cî ! Ev rast e! Ev dadkerî ye ! Min sond xwaribû, ez bi destê xwe te bikujim !".

Selaheddîn şûrê xwe kişand û kopek daweşand li Renaud de Chatillon û milê wî ji laşê wî cuda kir, anî xwarê. Çend efserên (zabit) ku li dîwanê amade bûn li bin lingê Qral - ku ji tirsan dilerizî - Renaud de Chat.il lonê birîndar kuşt û cendekê wî avêt dervayê çarderê. Selaheddîn di cî da berê xwe da qralê ku ji serê xwe ditirsiya û jê ra got : "Qralek qralekî nakuje. Ev meriv ji endazeyê nebekarî û bêbextî, ji zû da bider kiribû. Loma min bi vî awayî sezayê wî da".

- 174 -

Rûpel 175 - 180 : Vekirandina Quds:

"Di sala 583 Hicrî da û di 16ê hîva Recebê da, ano di sala 1187 Mîladî, 20ê Eylûnê da, li pey meydancenga xwînrêj a Hettînê, Selaheddîn li pêşberê bajarê Qudsê xuya bû û tavil bajêr dorpêç kir. Ev gertev ji bo Islamê bû hengameke ne ya jibîrkirinê. Baliyan d'Ibellin, qedxendarê (mudafî) Qudsê bû. Selaheddîn ji fillan ra radestkirina (teslîm) bajêr û bêjgoya (muzakere) serbê (rnuqedderat) a tûde pêşirand (teklîf) û bazarişne (şert) sivik û hoşwer (maqûl) li pêş wan kirin û ji wan ra got : "min ji bo bilindayiya navê Xudê evçend bajar vekirandin. Lê min bacên giran li wan bar ne kirin. Min tu stemkarî li wan ne kir, ji bo Qudsê ez dê çêtir û nermtir bibim. Ez dê qîma xwe bi 30.000 zêr bînim û fil leyên ku li hundirê bajêr in di çûna xwe û di mana xwe da dê serbest bin".

Baron û keşeyên Qudsê dil ne dikir li hev bên. Wan dixwest Kurd bixapînin, zexelî lê bikin û çend dem û rojan behredar (muteneffî) bibin.
Ew pir umîdwar bûn ku di nêzîkan da leşkerên dilîr ên A wrupayî bi zinarvejan (rnencenîq) û bi "bombard"an, bi keştiyên Cinevîzan li kenarên deryayê Lubnanê dê xuyanî bibin. Wan pêşlrandişên (teklîf) Selaheddîn ji xwe ra bê rûme tî difamand û digot: "Bajarê ku Xudanê me tê da miriye, çawa radestê Selaheddîn bikin ? Em vê cîgeha pirflraz û yezdanî çawan bifiroşin 1".
Selaheddîn enirî û ji wan ra got: "Hûn dê nefrînan li serhişkiya xwe bikin û, pir najo, hûn dê xwe bavêjin bextê min. Ez dê di çend rojan da bikevim hundirê Qudsê. Lê, wê gavê, ez dê çi bêjim ji hevalên xwe yên pîrozbext ra ? Ev hevalên min ên bajargîr dê bînin bîra xwe ku di sala 492 ya hicrî da we çi anîbû serê is laman. Ez dê çawa karibim nehêlim ku hevalên min heyfa xwe ji filleyên Qudsê venegerînin ? Baş bînin bîra xwe ! We li hundirê Mescid El Aqsa da 70.000 islam ser jê
- 175 -
kirin; Û cardin bînin bîra xwe ku di sala 398 da Xelîfeyê Misrê yê Fatimî hilweşandina tirba Isa ferm kir û di hundirê wê da çi hûrmûr hebû da talan kirin. Q cardin tiştên kirêt û çepel ku dîtin û bihîstina wan dilan pir diêşîne, ku we anî serê Islamê, bînin bîra xwe !".
Filleyên Qudsê bazarên sivik ên Selaheddîn ne pezirandin Û vegeriyan ciyên xwe. Selaheddîn ji nû da bi awakî xurtir û zortir rahişte dorpêça Qudsê. Bi keviravêjan cî cî bedenê Qudsê herifand. Roja dehê ya dorpêçê Baliyan d'lbellin korpoşman xwe avêt torûbextê Selaheddîn.
Selaheddîn ku xweşxuy, xweşwafir bû duruştî Û tundî jê pir dûr bûn. Ji bo ku Qudsê ji bobelat û wêrankeriya cengê rizgar bike xwîna beyhûde ne dirijand, jin û zarûk û bêguneh li ber lingan ne dipelaxtin, bi fermanadarê Qudsê, Baliyan d'lbellin Il li hev hat. Bazarên lihevhatinê ev bûn : filleyên Qudsê ji bo kirîna azadiya xwe, mêr deh dînar, jin pênc dînar û zaro jî du dînaran dê bidin, 20.000 bêçîz (feqîr> jî tiştekî sivik, 30.000 "êku", dê bidin.
Di sala 1187 da, li duduyê Çiriya Pêşîn, gava li Bexdê Xelîfe Nûriddîn, Imparatorê Rohilatê Issac l'Ange, Imparatorê Roavayê Frederic

Barberousse, Qralê Fransa Philippe d'Auguste, Qralê Ingilîz Henri Il şehriyarî dikir, Selaheddîn berê nimêja nîvro kela Qudsê vekirand.
Şadimaniya islaman pir mezin bû : dawer (qazî), mafdad (hakim), weşbest (şair>, derwerş û naçîzan ji bo pîroziya şehriyarê gewre Û navdar ji çar aliyên cihanê baz dida, dihatin.
Rûpel 182 :
Li Qudsê, ji darayî û dastûsamanên (serwet) ku ketin destê islamê û radestê Selaheddîn : zêr, zîv, gewher, pûrên (eşya) giranbuha, tu par ji vê gewerzê
- 176 -
(serwet) ji xwe ra ne bir. Gişî vê dastûsamanê di navbera kesên ku li Qudsê pê ra hevaltî kiribû : leşker. serleşker, dawer ... li wan par ve kir. Di gellek şepan da, ji belengaztirên fillan ra nermayî û neşmînî nîşan da, ji sivikkirina bûnlşên wan ên nuh ra li çare digeriya. Bîmarên ku di bîmargehan da dihatin derman kirin û xwedî kirin, ferman da ku ew di nexweşxanan da bên hiştin. Dêra "SaintSêpulcre" ji Ûriman û ji filleyên Sûriyê ra hişt. Bi fermana wî û ya birayê wî Adil, 1.500 filleyên bêçiz ji dana bac reha bûn.
Gava ku fille Quds dihişt û diçûn, ji bo ku li wan tu stemkerî çênebe, Selaheddîn li her alî ji birleşkeran ra pasvan bi cî kiribûn. Bi vî awayî, dixwest radar (manî) bike ku tukes li tola kevn negerre û tu filleyî neêşîne. Selaheddîn merivên xwe dizorandin,
dixwest ku pey kamwerî (muweffeqiyet) û serdestî, li neyarên dîl dilovanî û nermayî nîşan bidin. Selaheddîn di cengê da bilindrewanî ferman dikir. Evçend endazên (tedbîr> dûrendişî stendin ku fille bi ewlemendî û bê serêşanî ji Qudsê
derkevin. Paşê, ji deriyê Dawûd pêva deriyên din ên Qudsê dan girtin. Karwana nuxûnbextan (rnexlûb) ji ber Selaheddîn derbas bû. Di pêşiya gişan da Patrick Heraclius xuya bû. Pey wî kesên din hatin.
Patrick hin hûrûpûrên giranbiha yên dêrê bi xwe ra dibirin. Dîrokzan El Imad Sultan hişyar kir û got :

"Ev hûrûpûrên giranbiha bi peymannave divê gihajên pîrozbextan bibin". Selaheddîn ev ponja Imad guwaht, lê ji birinên van hûrûpûran ra destûr da û got :
"Olparaztîşên vêrast ên xudannasan paqijtir in ji zêrên li nav flraqên pirfiraz (muqeddes)". Pey van keşîşan, Satrapdarê bajêr, prens û giregirên Firing û Sûrî derbas bûn. Jinên Xaçparêzan xwe avêt dest û piyên Sultan û bi gazî û girînan jê niyaz dikir:
"Me hertiştên xwe wenda kirin : xanî, qafûqûr, hûrûpûr û welatê xwe. Ji vir pêda em dê derdê biyaniyan, serserî, sergerd û bedbextan bişûşikin.
- 177 -
Lê, tu karî şê û şikenc û derdên me yên evçend dijwar û giran sivik bikî. Mêr û kur û birayên me ku li ba te dîl in, girtî ne, van belengazan azad bike, bike seregerdora xwe, bide me; birînên me yên kûr derman bike, bedbextiya me hinek sivik bike". Selaheddîn ev dîlên ku van jinan jê hêvî û niyaz dikirin azad kirin û dan wan. Selaheddîn ji wan ra hîn bêtir jî kir : ji wan ra xwarinî (erzaq) da, perû û xelat li wan kirin, dilovanî û mihrivanî kirin.
Selaheddîn, pey vekirandina Quds, daket kenarê Deryayê Sipî. Ji aliyê nîvro dest pê kir û ber bi bakur hevraz bû, kel û bajêrên kenarên Deryayê hemûçkan vekirandin. Hin ji van kel û bajaran ku xwe diqedixand bi êrîşê ew standin. Hin ji wan jî dawiya serhatişên xwe bîr bir, şer ne kir, zûbizû pes kir û xwe bi erzanî reha kir".
Selaheddîn di pirên van şeran da, şûrê tazî li destan, li pêşiya leşkerê xwe êrîş dibirin neyaran, bedenan û keleyan. Ji wan kelan yek a bergirantir, kela "Bûrziya" bû. Em vekirandina vê kelê ji dîrokzanê Fransiz, Albert Champdor, distînin û li jêr dinivîsînin:
Rûpel 196-197 :
"Li her cî, gava ku siwarên musulmanan xuya dibûn, bajarên fillan mîna meyweyên gihîştî ji xwe ber diketin. Li bakurê rohilata Apamê, li kela Bûrziya, karê germtir çê bû. Bi nivîsandina Behaeddîn, ji bo ku ev kela ha carê nayê vekirandin, xwejber (tebîet) û pîşewerî (senet) yekaheng liviyane. Girên bilind û di tengalên hev da, çal û cuhên xweşberî çê kiribûn; hîn rasttir, fîsên heftê gaz kûr serrast kiribûn. Di nîveka van giran

da, zinarekî girs û fêriz hebû; Kela Bûrziya li serê vî zinarî ava bûbû. Ev kel dora Apamê diparazt.
"Selaheddîn nêzîkî kelê bû. Hûr lê temaşa kir û rind ew bazresand (tef tîş). Di gel nexwestina
- 178 -
fermandarên wî, bi êrîşgirtina kelê wehrîşa (qerar) xwe da. Prensên wî, bê perwa, ji vê pojna ha ra kustahiyeke mezin digot. Lê, karên giran şan û serfirazlyên giran tînin.
Sultan vegeriya ba ordiya xwe, keviravêj sazandin, pirên ji textan û pêpaskan (derence) dan çê kirin. Bi rojan kelê da kopandin, paşê ferman kir ku ji bo êrîşê hertişt amade bibe. Bi awayê taktîka xwe, birleşkerên xwe kire sê par. Ev her sê par li pey hev dê êrîş bikirana : mîrê Şingalê li birleşkerê yekim, Sultan li bir-leşkerê duyim, kurê Sultan jî li blrleşkerê sêyim fermandarî dikir.
Gava nîşaneya êrîşê da mîrê Şingalê, ji pirên darîn derbas bû, li hilkişîna kelê pêdar bû û çend deme (saet) xebitî, nikaribû pêpask bi cî bike û şûnda vegeriya. Selaheddîn ket şûna wî, şûrê xwe kişand, "Al lahû Ekber" got û qêr kir, ket pêşiya leşkerê xwe. Ordî giş ev qêrîna Selaheddîn, qêrîna cenga Islamê, bi dengekî bilind qoriya, bi êrîşeke wusan ku li cihanê tukes nikare xwe li ber bigre - di bin barana tîran da, şûrê tazî li destekî, li destê din jî mertaleke sivik - dirêjî kelê kir û berî herkesî hilkişiya ser dîwarê bedenê û xwe avêt meydana kelê. Bo demeke hindik, fille dora Selaheddîn girt, jîna wî kete kujarlşê (tehllke): lê bi hunerbaziyên leşkerên xwe zûka ji fillan reha bû. Neyarên dorpêçkirî dildayên nêrûmendiya Selaheddîn bûn û jê ditirsiyan, xwe avêt dest û lingên wî û jê bext xwest. Selaheddîn ji dorpêç kiriyan ra bext da û ew niwaztin (lutf) û fermandarên wan bi hin siwaran şandin Antakyê".
Rûpel 257 - 285 :
"Êdî dorpêça Ekka ji bo herkesî bêdawî dirêj dikir û diçû. Kêmaniya xwarinî, nemaza di vê germê da, nexweşiyên leyok û hovnak û bi xwarinên kirêt û
- 179 -

gemmar, ordiyên fillan diherifîn û homanweriya (manewiyat) wan ro bi ro qelstir dibû. Serhengan, ji bo demandina pêjnişa şerevanî ya leşkerên xwe, nikaribûn yekcaran şebxûn û xerpişan bikin, çima ku di van xerpişan da leşkerên Xaçparêzan ne dianî bîra xwe ku di riya olê da bimrin û herin buhuştê. Wan ji peydakirina xwarinî û talankirina neyarên xwe bazdida. Prensên Firingan baş fehm kir ku ev bûnişa han heya demsala baranê nikare dirêj bike. Loma wehirandin ku çi dibe bira bibe, divê ber bi Heyfa derbasokek peyda bikin û xwarinî bi dest xînin, leşkerên xwe ji birsîtiyê reha bikin.

Fireng, gava bihîst ku Selaheddîn nexweş e û di nav ciyan da dinale, gewzxweş bûn û ev şep di destê xwe bernedan. Sala 1190, 13 Çiriya Paşîn, bi sipîtayiya rojê ra, ordiya Xaçparêzan bi rê ket. Leşkerên Firingan xwe da tenişta hev, wek dîwarekî yekperçe xwe avêt pêş; û wek baran tîr û zobîn (rim) barandin. Di germîçanka ordiya fillan da girdîleyek (erebe) ala Xaçparêzan hildigirt. Fille bi dirêjayiya çemê Bêlûsê diçûn.

Selaheddîn nikaribû slwa bibe. Ferman kir, bi çardarê ew bir ser girê Xarûbê. Selaheddîn ji vî girî tevgera neyar nehêrdarî (kontrol) dikir û li leşkerê xwe rêdarî dikir ...

Cenga hanê bi harî û dijwarî sê rojan dirêj kir. Lê, Xaçparêzan nikaribû ji navberên rêzên neyarên xwe derbas bibin.

Selaheddîn pir qels ketibû. Xwe li ser piyan nlkarlbû bigre. Çima ku ne di nav leşkerê xwe da bû û hevaltiya kujarij a wan ne dikir, ji kulê dilan digiriya. Kurên xwe yên ku lê nehêrtî dikir û li dora wî kar dikir şandin meydana cengê, ji wan ra digot :

"Divê hûn bibin nimûne ji leşkerê Islamê ra. Çawa ku ez ne nexweş bûma, min dê xwe bikira nimûne". Paşê ev pirs li ser gotinên xwe efzunandin : "Divê kurên min hergav bînin bîra xwe, kujaretirên ciyan ciyê wan e".

- 180-

Di vî şerê pir xûnrê] da, ji her du aliyan yek jî kamwer ne bû. Lê, Firing ku bivê nevê vegeriyan Ekkayê, şikestin, wuha ye, bû para wan.

Ji mezinên Firingan gelek dîl ketibûn destê Selaheddîn. Rojekê, Selaheddîn yekî pîr û bêtab di navbera wan da dît û jê pirsî : "Tu ji kîjan welatî yî ? Kal lê vegerand : "Welatê min pir dûr e, ji bo ku tu blglhêji wî

divê ku tu bi mehan rê biçî. Selaheddîn cardin ji kalo pirsî : "Tu ji wî welatê evçend dûr û tu evçend pîr î, çawa û çima hatî û çima bi min ra şer dikî ?". Kal ji Selaheddîn ra vegerand : "Ez ne hatim bi te ra şer bikim. E'z hatim Qudsa Homanwer dorger bikim". Selaheddîn wuha lê vegerand "Wusa ye here ! Dorgera xwe bike ! Min tu azad kirî. Here temenê xwe yê mayîn di nav zaroyên xwe da derbas bike! Q ji bo nehrevaniya dilpaqij a min van diyariyan ji wan ra bibe !". Selaheddîn ferman kir, ji kal ra hespek da, diyarî dan wî û ew bir şergeha Xaçparêzan.

Selaheddîn ji dîlên din ra hindiktir niwazîş ne kir. Li aliyê tenişta çardera xwe, ji wan ra çarderek da vekirin, wekî ku jê ra bi mêvanî hatine rûmet kir û ji wan ra xweş darî û ciwanmerdî nîşan da. Çend roj bi şûn da ew şandin Şamê.

Rojekê, leşkerekî Selaheddîn zarokekî sê mehî ji himêza diya wî girt û revand. Dayika bedbext û pepûk bi girînan çû ba Qralê Ingilîz, derdê xwe giliyê wî kir û peydakirina zarokê xwe xwest. Qralê Ingilîz jê ra weha got : "Ev kisse ji mefera min dere. Here, derdê xwe ji Sultanê Islamê, Selaheddînê Kurd, ra gilî bike ! Ew merivekî dilovan e. Bivê nevê, ew dê çarekê ji derdê te ra bibîne". Dayika derdinak havilek peyda kir û xwe gihand dîwana Selaheddînê Kurd, giliyê xwe jê ra kir. Sultanê dilovan ê dadker di nav ordiya xwe ya fêris - ordiya sedhezaran - da, berî ku roj here ava, zarokê gunekok peyda kir, da destê diya wî û bi diyarî û xelatan ew şand şergeha Xaçparêzan".

- 181 -

Rûpel 274 - 275 :

"Conrard de Mont Ferrat xeyidî, dorpêça Ekkayê hişt û çû Tîr. Evçend engîzên ku nuxûndariyên (lht.llaf) prensan demandin ne bes bû, Qralê Ingilîz, Richard Coeur de Lion, û yê Fransiz, Philippe August, her du jî di rojekê da nexweş ketin. Her du jî bi yek dengî yekûdu bi jarandinê xist bin buhtanan. Van çîvanokan dilê Selaheddîn hênik dikir. Selaheddîn camêrî û bilindrewaniya xwe bi awakî enzanperwerî eşkere kirin.

Lê, filleyên Ekkayê hînî tiştine bilindfiraz ên weha ne bûbûn. Filleyên dora Ekkayê ji rik û kînan pêve tu karekî din ne dizanibû. Li vira pir behreyên

nixûndar hebûn. Wan berkeşiya hev dikir û di nixûnên hev da gellek dek û pîk digerandin.
Selaheddîn, gava ku bihîst ev her du qralên Xaçparêzan di nav nivînan da ji ber tayê (malarya) dinalin û dilerizin, ji wan ra mirîşk, berf, gulav û xoşavên tezî (sar> şandin. Roj bi roj, ji bûnişên tendurustî yên herdu ferweran agahdarî dixwest".
Rûpel 334 :
"Selaheddîn gava bawermend bû ku keştiya Ingilîz a dawiyê berê xwe da roava û ji ber çavan wenda bû, birrleşkerên Şingal û Mûsilê perwandin.
Ji kurê xwe Melik Zahir ra - ku amadeyê çûna Helebê bû - wuha şîret kir :
"Ez te dispêrim mezinatî û tuwandariya Xwedê. Ez te dispêrim wî Xudanî ku serekaniya giş qenciyê ye. Ji fermana Xwedê ra serflrû bike, çima ku riya aştî û rehayê eve. Rind baldar bibe ! Bira xwîna beyhûde nerije, çima ku xwîna rijiyayî tucar bi şûnda venagere ! Bixebite ! Dilên merivên xwe bi dest xîne. Bi hişdarî, sûd û qenciyên hawişê Islamê biparêze. Çima ku te ev ustubar (wezîfe) ji min û ji Xwedê stendiye, bitenê ji bo gihandina misilmanên rastîn
- 182 -
bi jîneke bextiyar. Cardin, ji bo ku tu karê xwe rind bigerînî, divê tu dilên prens 0. gewremerdên xwe kar bikî. Min mezinatiya Xwedê bi karkirina dilên merivên xwe bi dest xist. Di tu demî 0. di tu warî da, di nuxûna tukesî da ponjên bedxwedî meke".
Rûpel 336 :
"Paşiya paşîn, pey xuyanekirina çar salan, Selaheddîn di sala 1192 da, di 14yê Çiriya Paşîn da, di navbera şadiya kelakelên tade da vegeriya Şamê. Bajar bi tevayî di şadmaniyê da bû, Cejn bi hefteyan li pey hev dirêj kir. Ev şadmaniyên ku ji bo "Qehremanê Islamê yê paqijtir" çê dibûn, Şamî giş bi carekê xwe tevê kir. Pey Muhammed, tu meriv ne gihîştiye evçend şan 0. rûmet 0. payeyên bilind. Selaheddîn, gewretir 0. bilindnavtirê pîrozbexttir ê Islamê bû, Selaheddîn bi karkirina şerê Hettînê deriyê Qudsê vekir 0. perdeke reş di navbera Roava 0. Rohilat da girt. Ji wendakirina Qudsê, li gundên biçûçlk ên Firingan jî digiriyan 0 li van deran ji Selaheddîn ra nefrîn dikirin ...

Lê, li van doran (Şam, Sûrtya, Misr), Selaheddîn di jîndariya xwe da 0 ji bo nejadên mand (îstiqbal) bû şûrê Islamê. Ew bûbû minişa (t.imsal) nebexetiya (deha) Islamê. Ew bûbû rewş 0. nîşneyê Islamê.
Wanên ku dianî bîra xwe ku di mandê da serê xwe rakin navê Selaheddîn bi tenê ew dilerizandin.
Ji bo aşandina (selam) Selaheddîn, ji her alî, ji quncikên tenha yên Satrapan, mîr, serek, zanişmend, dawer ... dlşûrikîn, dihatin Şamê. Weşbestan (şair) di weşbeste 0. daslstanên xwe yên derberz da ji siwarê Xwedê Selaheddîn ra distira 0. dilorand ...
Li bin azimanê Erebistanê yê ronak 0. gûrîpaş, li ser riyên Deryayê Kaspînê, yan li derbasokên hundir ên avsûnklrî yên Asyayê 0. li her ciyan : li bin
- 183 -
konên bedewiyan, li kaşaneyên Isfehanê, li holên Berberan, li cîgehên (kamp) Mongolan; belê li her ciyan : li şîpanderên Tîbet, li çiya û zozanên Hebeşistanê yên bilintir, weşbestên ku dîrokên qehremanan distirên ji Cihanê ra serhatiyên "Qehremanê Islamê yê paqij" didan bihîstin".
Rfipel 337 :
"Hêj di destpêka sala 588 a koçbarî (Hicrî) da, ano di 1193 P.Z. da, tendurustiya (slhhat) Selaheddîn pejrokî (perîşan) bû. Xizmetçî derî li Şamiyên ku lezûbez dihatin pirsiyariya Selaheddîn digirt. Bijîşkên (doktor) Selaheddîn bi birrayî (qet'î) ne dihişt ew derkeve derva. Lê Selaheddîn di sala 1193 da, di destpêka meha Sibatê da, çû pêşiya Heciyên ku ji Mekkê vedigeriyan. Li geliyê sar ê Bereda serma girt, li ser hesp teviziyên tayê ew pir diêşand. Selaheddîn bi zor xwe li ser zînê hesp digirt. Bi awakî perîşan gihîşte Şamê û îcar bi rastî kete nav nivînan. Nexweşiya wî - tayê tîfo - zor lê da. Di 21 Sibat, roja yekşembê, serê sibê da Behaeddîn bi du kurên Sultan ve - Fadil û Melik Fadil - hat ji bo pirsiyariya Sultan. Lê, ew di bûnişeke bê tab da bû. Selaheddîn gava kete "koma", Şam seraser şîn girêda, çarsû (bazar) giş hatin girtin.
Gava ku Melik Fadil nêzîkbûna dawiya bavê xwe - di bin nalîn û qêrînên aliyê malê da - fehm kir, Satrapê Şamê, gişî mîran, atabegên kurd ên ku li

Şamê amade bûn bang kire Kelê. Li pêş Melik Fadil giş civatê sond da, gerdorî (qesema sedaqetê) kir.
Sonda ku Qazî nivîsandibû, xurbêja (metn) wê ev bû : "Ez, ji nuha da sond dixwum, jîndariya Selaheddîn ez dê jê ra gerdor û serfirû bimînim, hergav ez dê ferweraniya wê biqedixînim (rnudafaa) û piştedariya wê bikim, jîna xwe, darayiya xwe, şûrê xwe û merivên xwe ji bo pîşekarlya wî amade bikim. Pey
- 184 -
wî ra, ez dê vê bawermendiyê ji bo kurê wî Melik Efdel û peyhatiyên wî ra bikim. Bira Yezdan ji min ra neh revan bibe; ez xebata xwe, hebûna xwe, jîna xwe, şûrê xwe, merivên xwe, bitenê ji bo parastina ferweraniya wî deynim. Ez sond dixwum ku xebtûkoşa min dê wek peymana min bibe, çima ku ji gotinên min ra Yezdan nehrevan e. Eger ez van sondan ji bîr bikim, bira jmen min berdayî bibin, beniyên min serazad bibin û ez xwas herim dorgera (tewaf) Kabê".
Rûpel 339 :
"Paqijtirê Qehremanên Islamê" pir naçiz mir. Giş darayiya ku hişt çil û heft dînar û zêrekî <Tîr) bû.
Diravê ku bo şuşt.ina wî divabû, bi bedih (deyn) hat peyda kirin. Qerqer û karûbarên wî qaziyê Şamê Fadil berpêş kirin. Lê, Sultan Selaheddîn di jîndariya xwe da, ji bo tuwangerbûnê du şep - şepek di mirina xelîfeyê fatimî El Adîd û şepek din jî di mirina Atabeg Nûreddîn - ketin destê wî. Kenzine Xelîfeyê Misrê ji leşker û serleşker û merivên bin destê xwe ra par kirin. Ji hebûna Nûreddîn ku wek gir û çiya bû tiştekî biçûçik ji bo xwe ne girt û ev darayiya fêris radestî kurên Nûreddîn kir".
Rûpel 340 :
"Şîn bû gişkî, çima ku pey mirina çar Xelîfeyên Awist (meşrû) Islam kopeke evçend dijwar ne xwaribû. Ji bo şadiya rewanê wî li Mekkê û li Medînê hêviş (dua) xwendin. Bi rêzimana Islamê, ev ayinên firazbaz bitenê ji bo Xelîfeyan çê dikirin. Cendekê wî leşkerê olperwer paş nîvro bir baxçeya seraya havîngehê. Paş çend salan, jê ra di nêzîkayiya Mizgefta Mezin, di tenişta xwendegeha Azîzîye da tirbeke nû hat çê kirin. Ev tirb bû cîgeha wî ya herdemî".

- 185 -
7- Xoristan Û Sîsistan :
Pey êrîşên Cengîzxan çend sal bi şûnda, li Xoristan û Sîsistanê padîşahiyeke Kurd serrast bû. Ev padîşahî di xuyakirinê da di bin siya Cengîz da bû; lê bi rastî padîşahiyek serbixwe bû. Ev padîşahî 130 sal ferweranî kir. Paşê Tîmûrleng hat û ev padîşahiya Kurd wenda kir.
Di hengama vê padîşahiyê da, zanistî û xwendevanî pir pêş da çûbûn. Padîşah Mazlddînê Muhammed di alîkarî û halandana zana û xwendevanan da gellek nav û deng bû. Zanayê nebe xe û bi nav Saîduddînê Tevtenamî di bin parastina vî padîşahî da bû (29).
MIRIY:f:N KURDAN DI HENGAMA ABBASIY AN DA Werzişcuyê (rnucahld) Mezin ê Kurdan, Eba Muslimê Xoresanî, di sala 750 P.Z. da Xelîfetiya Emewiyan wenda kir, di şûna wê da Xelîfetiya Abbasiyan danî. Bi vî awayî Kurd ji wendakirinê reha kirin. Pey vê wergerka sosretbexş, li çar aliyên Kurdistanê bê jimar Mîrî serrast bûn.
Bi rastî, van mîriyan û her heft padîşahiyên Kurdan ku me nuha navên wan nivîsandin ronakî û mezinatî û yekîtiya Kurdan a berê venegerandin. Bi çewtî û gunehkariyên Azdiyakê gewzeger û Darayê yekim ê payexwaz û çavnetêr Imperatoriya Kurdistan a fêris firazbaziya xwe wenda kiribû. Wergerka Eba Muslimê Xoresanî bilindayî û xurtiya Kurdistan a kevnare bi cî ne anîn.
Lê gava ev mîriyên bê jimar serrast bûn, li her aliyê Kurdistanê hezaran kel, burc, barû û şato ava kirin. Bi sîdariya van kel û baruyan, Kurdan xwe ji Mongol û Tirk û Tataran parast. Leyandinên van barbaran hinek erzantir derbas kirin.
Belê, •di sedsala 13im da, leyandinên Mongol, Tatar û Tirkan dest pê kir. Ev leyandina van barbaran
- 186 -
300 sal bê aram dirêj kir. Ji Hindistanê heya Anadolê, bi sedan kîşwerên ava û gumreh wêran ban, milyon û milyonan enzan bi destê van cenawuran hatin kuştin !!!
Kurdan xwe spart kel 0 şatoyên xwe, xwe parast. Penahên wan birc û bara ban. Çiçend ku ji wan hat, xwe bi erzanî ji van barbarên cenawur û

talanker reha kir. Kel 0 bara 0 şatoyên bê jimar, mîrên mêrxas û dilpola, cengawerên çekbaz û canbêzar gelê Kurd ji wendabûnê rizgar kir.
Kurdan hebana xwe ji van kela şatoyan ra, ji van mîran ra, cengawerên Kurd ên çekbaz û cengbazan ra bedihkar in. Lê paşê bobelatên din çê ban ! Ji sedsalan ve, Ereban, Eceman 0 Tirkan Kurd dorpêç kirine. Dilxwaza wan ev e ku Kurdan parî parî bikin, di nav xwe da bipişifînin 0 wenda bikin û Kurdistanê daqurtînin. Ji bo gihîştina vê armancê, di destên wan da çekine bê awa hene. Lê, xurttirên çekên wan Islam e. Ji kevn da ola Islamê ji xwe ra kirine destik, bi durûtî 0 planan adek û dolavan xwestine Kurdan tune bikin ! Kurdistan, nişтimanê Kurdan, bikin das tê (mal) xwe. Kurdan bi werzlşên mêrane li ber xwe da, mêrxasî û qehremaniyên mezin kirin. Pir muxabin ! Dilîrî 0 canfeşaniyên ku Kurdan ji bo maf û azadiya xwe kirin, di dîrokan da, di tu nivîs waran da ne hatine nivîsandin; di cihanê da ne hatine bihîstin û dîtin. Nemaza, di vê sedsala paşiyê da, ji bo parastina hebana xwe canfeşaniya ku Kurdan kirin cihanê giş dilda û mat kir. Kurdan bi şilfaxenceran êrîşî topan û mîtralyo-
- 187 -
zan dikirin ! Kurdan bi van behadiriyan neyar mat û devekirî hlşttbûn.
Evçend camêrî 0 mêrxasî Evçend pesnxan 0 dasitan ! Heya îro mana Kurd 0 hebûna Kurd ji ruyên van birc 0 baruyan, ji van mîriyên bê jimar in. Ev tişt bi sîdariya Eba Muslimê Xoresanî yê nebe xe hatiye meydanê! Rehakarê Kurd, ev pehlewanê yekta ye.
Belê, hezaran muxabin ! Ev mîrên bê jimar ên Kurd nlkarlbûn dev ji xudbîniya xwe berdin, giş gotinên xwe bikin yek, ji bo rizgariya Kurdistan yekîtiyekê çêkin, ji nav xwe Padîşahekî bibijêrin, Padîşahiya Gewre ya Kurdistan vegerînin, Şahînşahiya kevnare ya Kurdistan vejînin.
Belê, ev camêrî ji van mîran çênebû, vê mezinayiyê, vê dilgermiyê nikartbûn nîşan bidin.
Lê ev mîrî, digel sûc 0 gunehên xwe yên pir mezin, di paydarbûna Kurdan da bûne faktorekî bergiran, bûne engîza hebûna Kurd. Loma, em jî ji bo vê qenciya wan navên miriyên ku me karlbû bida hev li jêr dinivîsînin.
Di nivîsandina van navan da, me ji rohilat dest pê kiriye 0 ji berê va em hatine ber bi roava :

1- Erdelan (Kelhor> : a) Pilingan. b) Derteng. dTahîdest. 2- Siyahmensîr. 3- Cengî. 4- Zengene. 5- Pazûkî. 6- Somay. 7- Sehran (Soran). 8- Mahmûdî, 9- Mukrî. 10- Baban. 11- Biradost. 12- Behdînan. 13- Hekkarî (Sîno). 14- Mikis. 15- Bedlîs. 16- MOş. 17- Sipayerd. 18- Sasûn (Herzo). 19- Botan :

1. a) Azîzan. b) Gurgîl. c) Fenik (30). 20- Hesenkêf.

21- Sêrwan : a) Kufra. b) Kefrî. c) Iron. 22- Xerzan. 23- Farqîn. 24- Zirkî : a) Derdin. b) Gurdîkan.

1. c) Hatax (Licê). d) Tercil. 25- Batman. 26- Qulp. 27- Cebaqçûr. 28- Gênc. 29- Mlrdasî : a) Egil.
2. b) Palo. c) Çêrmûk. 30- Siwêrek. 31- Çemîşgezek a) Mencîkurd. b) Pêrtek. C) Sekman. 32- Koçhîsar, 33- Dûrik. 34- Egîn. 35- Rişwan. 36- Entab.

37- Kilîs. 38- Mendêlan : a) Mêrdîn. b) Qesrîk.

39- Sorikan.

Ev navên mîriyên Kurdan ku me li jor nivîsandin pirên wan me ji Şerefnameya ronakrewan Şeref Xanê Bedlîsî standine. Hinek ji wan jî me ji nivîswarên din dane hev. Ji van mîriyan pêve, îro li Kurdistanê gellek mîriyên din jî hene ku navên wan ne hatine nivîsandin û ne ketine nivîs warên dîrokan. Lê, mîriyên ku me navên wan li jor nivîsandin, îro bi navên xwe yên kevnare li Kurdistanê paydar in.

Ji van mîriyan pêve. birekî din heye ku di sedsala 13im 0 14 da, bi leyandina Mongol 0 Tirk 0 Tataran, bicarekê wenda bûne. Hinek mîriyên din jî bi şerên hundirî nabedîd bûne,

Pey van berjendişan (îzahat), divê ku em hin zanegî û zanişmendiyên dîrokî yên çewt û çelwer (mubalaxa) ku di gihaja Mîrê Azîzan, Mîr Bedirxan, da hatine nivîsandin û feşandin durust bikin û rastiyê bibêjin:

Di van salan da, di gihaja Mîr Bedirxan da bi roj nave , kovar 0 nivîs waran pir tiştne bê bingeh û bê serûbin hatin nivîsandin. Ev nivîstekên han giş ji serapa, çîrok, efsane û nîgaşên (xeyal) bê sûd pêve n tiştek in. Ev rîzeyên (nesrtyat) nîgaşwer bicarek ji vêrastê dûr in. Di van nivîstişan da ji sedî yek rast tu neye.

Bi nivîsandinên van roj nave , kovar 0 nivîswaran, Mîr Bedirxan, mîna Carê Mosqofan, Petroyê Mezin ê bi nav û deng, xebatkar, rahijmend (muşteşebbls), dûrbîn, dûrendîş 0 pêşvexwaz bû. Mîr Bedirxan di gola Wanê da geşteceng sobandiye (seblh), ji bo

- 189 -

hînbûna zanişên zanişmendî, hunerwerî û pîşeweriyên (sen'et) modêrn xwende mend şandine Awrupayê, li Cizîrê karxaneyên top û tivingan sazandine, barûdxane serrast kiriye. Ji van rahijmendiyên bergiran pêva tiştên din ên hêjatir û gewretir - leşkerî, konevanî, şehrevanî - jî çê kirine û kamwer bûye : ji Urmiye ta Siwêrekê, ji Mûsilê ta Mûşê yekdestiyeke gelî û leşkerî pêk aniye. Di vî erdê fireh da, bi ordiyên Osmaniyan ra şerne dijwar kirine ...

Lê di dawiya van meydancengan da felek bi pîrozbextî bi Bedirxan ne keniyaye ! Ordiya Mîr şikiyaye, Mîr xwe avêtiye kela Erux, heşt meh di kelê da bi Osmaniyan ra şerne bê hawe kirine.

Me zanişweriyên jorîn bi kurtebirî nivîsandin. Ev zanişweriyên han di gîhaja Mîr Bedirxan da, bi awakî pejirandî, bi hengam û timare (tarîx û erqam) li Awrûpa, Misr û Sûriya, di roj nave , kovar û nivîs waran da hatine nivîsandin.

Lê, di gel xeptûkoşên me yên bi germî, em di tu nlvîswara dîrokê da rastî zanişweriyên wusa ne hatin. Dîrokzanên rohilat û roava yek JI JI van angaşt (iddia) û nivîzişan ne gûwahtiye (tasdiq). Ji van dîrokzanan yek jî di nivîs wara xwe da ji bo mezinatî û hozanweriya Mîr Bedirxan yek pirs ne nivîsiye. Nemaza dîrokzan giş di gola Wanê da ji sobandina keştecenga Mîr Bedirxan ra keniyane. Nivîswarên dîrokan bi yek demî, ji aliyê Mîr Bedirxan, şandina xwendemandan li Awrûpayê, sazkirina fabrîqayên top û tivingan, çêkirina karxaneyên barûdê li Cezîrê, yekdestiya gelî û leşkerî di erdê fireh û fêris ê di navbera Urmiye û Siwêrekê da, Mûsil û Mûşê da, jî napezirînin. Van engişan giş ji rastiyê pir dûr dibînin, dibêjin û dinivîsînin. Ev engişên han derjêyên (netîce) bişkavtinên nêrûnîgaşên (texeyyul) rapirî (mufrtt, zêde) ne, yaxut bermeyweyên bêhişbêjiya (heyecan) mejikî ne ...

Bi zanişên nivîs warên dîrokê, Şoreşa Mîr Bedirxan heft, heşt roj dirêk kiriye. Paşê, Mîr Bedirxan xwe
- 190-
avêtiye penaha kela Erûxê, di vê kelê da sê roj pêdarî kiriye 0 li dawiyê radestî (teslîm) Tirkan bûye, Tirkan ew bi malî biriye Istanbûlê.
Mîr Bedirxan li pêş Padîşahê Osmaniyan, Sultan Mecîd, çarîna jêrîn a Omerê Xeyyam xwendiye
Nakerde guneh der cîhan kîşt bugo !
An keskî guneh ne kerd çûn zîst bugo
Men bed kunen tu bed mukafat dihî,
Pes ferqî meyanî men 0 tu çîst bugo
Gava ku Mîr Bedirxan wegeha (îtîraf) sûcê xwe kir, Sultan Mecîd ew bexş and (efû) 0 payeyê paşatî dayê.
Mîrê Kurdan bû Paşayê Tirkan. Pey mirina Bedirxan Paşa, goya çend zarokên wî çûne Kurdistanê 0 li Çiyayê Madenê bi Tirkan ra dûr 0 dirêj şer kirine. Ev qisseya hanê ji nîgaş 0 efsane 0 çîrok e. Li Misrê, neviyê Bedirxan Paşa dema ku li kenarê Nîlê gerûgeşt dikir, hate cûş 0 xurûşê 0 şerê Madenê wek romanekê, wek çîrokekê nivîsî.
ÇEND GOTIN JI BO EBA MUSLIMÊ XORESANÎ YÊ REWANPAK
Nuha ku me dawiya Dîroka Abbasiyan ne aniye, divê em çend gotinan ji bo Eba Mus1imê Xoresanî binivîsînin :
Kurdên ku Omer Ibn Xettab, Xelîfeyê duyim ê Islamê, kopandibûn 0 mlrandlbûn - berê ku sedsalek û nîv derbas bibe - bi nebexeyî, bi dilgermî 0 mêrxasiya Eba Mus limê Xoresanî ji nû da derketin meydanê.
Belê, ê ku Kurd vejandin Eba Mus1imê Xoresanî ye. Mezintirê Kurdan ku ji bo payedariya Kurdan li cihanê xebtûkoş kiriye Eba Musltmê Xoresanî ye. Bi halandana vê bawerbûna han, li ser wergerka ku
- 191 -
Eba Muslimê Xoresanî afirandiye, em dê çend pirsên din jî bêjin : Wergerka ku Eba Muslimê Xoresanî afirand gertevek pir mezin e. Ev wergerka pirfiraz ji Kurdan ra can da, Kurd vejandin, Kurd ji tunebûnê, ji malrnîratbûnê reha kirin.

Wendakirin û ji ruyê cihanê bicarek maltina Imparatoriya Emewî ya bi destê Eba Muslimê Xoresanî wek herifandina Nînwa û wendakirina Xwehermenda Asor bi destê Key Kubbadê Kurd û Neviyê wî Key Aksar bergiran e.
Ev wergerka gewre li Endelus, Afrîqa Roava, Misr, Yemen, Hicaz, Sûriya û Filistînê ji aliyê civatî û konevanî guhartineke bingehî û tevheviyeke dijwar çê kirin. Ev wergerka fêris Kurdistan vejand, geş kir, zînde û ava kir.
Pey vê wergerkê, li Kurdistana fireh mîriyên bê jimar hatin meydanê. Li çar aliyên Kurdistanê kel û burc û şato hatin ava kirin û, bi sîdariya van burc û baruyan, Kurdan bi erzanî xwe ji leyandina Tirk û Tataran reha kir. Ev burc û baruyên rehadar îro jî ji Belxê heya Deryayê Reş, ji Araratan heya Sûriya û Filistînê, di van kişwerên fireh da şopeyên wan hene û îro jî xuya ne.
Ev kel û şatoyên bê jimar ku li devgeliyên teng û çepokaşan, li kotên bilind, li çiyayên sîdar û serklşlyayî, li ser zinaran, li pozê herfaz û tûj yên birrekan ava bûbûn. Di roja tengasiyê da, ji Kurdan ra bûn parazgeh û penah. Di sîdariya van kelên bilind, tebût û tekûz da, di sedsalên 13yim û 14yim da, gava ji Tirkistanê Mongol û Tirk û Tataran, mîna leyiya bobelatan, dirêjî Kurdistanê kir, Kurdan hinek erzantir xwe ji destê wan reha kir.
Cardin Kurd ji se sal bêtir devgirtî û destgirêdayî mabûn. Bi sîdariya wergerka ku bi bîrewerî, karmendî û camêriya Eba Mus limê Xoresanî serrast kiribû, Kurd bûn xwediyên şepa dest û zimangirêdanê :
- 192 -
weşbestên Kurdan dest bi nivîsandina weşbeste, destan Û mersiyeyan kir. Dengbêj stran nuhurandin, kur Û keçên nazenîn bi dîlan Û govendan şayî, dilgeşî Û gewzewerî li çar aliyên xwe feşandin. Çerbaziya siwaran, tîravêjî, mertalgêrî Û behadiriyên xortan ji nûva bi çapikî Û çalakî candar bûn. Kurdistan hêdî hêdî ax Û birînên dilan, şîn Û girînên huduran dest bi jibîrkirinê kir. Ji berê va vedigeriya kamraniya berê, xurremî, şadmanî Û bextiyariya xwe ya kevnare.

Emperyalîzma Ereban bi tumî 110 sal Kurd ji mafên xwe yên enzanî, nişţimanî Û gelîtî bêpar kiribûn. Emperyalîzma Ereban bi rik û kîn Û zorê Kurd dikirin Ereb ! Armanc Û dilxwaza wan wendakirina Kurdan bû !
Lê, Eba Muslimê Xoresanî vê bêdadiya duruşt (xesîn) Û şikolek a Ereban ne hişt here serî. Wî, bi yek kopan dina yeman, ev şep ne da Emewiyan ! Eba Muslimê Xoresanî di meydana şer Û cengan da "Emperyalîzm"a Ereban pelaxt ! Di bin lingên xwe da pelçiqand ! Eba Muslimê Xoresanî ev fer û taba wêranker û xudkam bicarek ji binî wenda kir!
Hezaran şabaş, Eba Muslimê Xoresanî ! Gelê kurd Û nişţimanê kurd ji bin zorbatiya Ereban rizgar kirin.
BÊBEXTIYA EREBAN Q ABBASIYÊN ÇILVERK
Eba Mus limê Xoresanî şehriyariya Emewiyan nabedîd kir, ji gelê Kurd ra wêtê (deyn) xwe bi cî anî. Kurd di bin barê emperyalîzma Ereban da çûbû ber mirinê; Eba Muslimê Xoresanî ew vejand, zînde û candar kir. Lê, bi Kurdan ra hemgaveyên (eynî zeman) wan : Elewî, Haşimî û Abbasî jî ji mirinê, ji zindanê. ji malmîratiyê reha kirin. Xweşber, ezbeta Hezretî Elî giş divabû spasdara Eba Musllmê Xoresanî bibe. Wî ev Ezbet ji bin zerzemînan deranî, li hevrazên bilind danî, ji zindanan reha kir,

li ser postê xelîfetiyê, li ser Textê şehriyariyê rûniştand.
Lê, Xelîfeyê duyim ê Abbasiyan, Ebû Cafer Muham-med El Mansûr, nankor û bêbext derket! Qenciya Eba Muslim zû ji bîr kir ! Spasdariya xwe ji vî camêrê mêrxas ra bi awakî bêbext û telaqreş, bi kuştina wî, vegerand ! Belê, Xelîfe Muhammed El Mansûr bê tirs û şerm ev fêris, ev nebe xe di hundirê Seraya xwe da kuşt, cendekê wî yê pirfiraz parî parî kir û avêt çemê Diclê ! ! Ev bêbextê Ereban, Xelîfe El Mansûr, gava bi bêbavî Eba Muslimê Xoresanî di Seraya xwe da kuşt, Weşbestê wî, Hebeşî Ebû Duleyme, şerm ne kir, ruyê xwe yê reş cara duduyan jî reş kir û bi Kurdbûna Eba Muslim jî yariya xwe kir û di hengama kuştina wî da weşbesteyên jêrîn gotin:

- ç ç ç
..1 ~I .J)~ 1)..illl JAI ul ~I O)JS ..;:.J)6.)~I OJ)..I ~
-.ç..:..:.:.:u J:.:ill ~,> rft"" ~I

..l).,JI ...l..uJII ~,> 1....: ~
WERGERKA vs WEŞBESTI: BI KURDî
Bavê mirarker, Xwedê firawana (*) xwe li ser hulûlkê (*) xwe naguhere, ta ku ew kes ji riya qenciyê danegere.
Ma tu di bin siya X wehermenda Mansûr da dikî bêbextî bikî ?
Lê rast e. Kesên bêbext bavpîrên te yên Kurd in. Bavê mirarker ! Te ez tirsandim û te zirt li min kir.
Lê, tola min şêrê mezin ji te hil kir.
- 194 -
MANSUR, XELIFEY~ DUYIM ~ ABBASIY AN RIY A XWIN Q BEDBEXTIY~ VEKIR
Xelîfeyê duyim ê Abbasiyan, Ebû Cafer Muhammed El Mansûr, di destpêka şehriyariya Abbasiyan da xwîna mêrxasekî bêguneh rijand, bi bêbavî qencxwazekî Abbasiyan kuşt, nankoriyeke mezin kir û bi awayê han riyeke çewt û çepel nîşanê xanedana Abbasiyan da. Ev riya çewt û çepel li xanedana Abbasiyan ne hat. Ev riya xwînrijandin û bêdadkerî û bextreşiyê bû engîza wendabûna xanedana Abbasiyan. Abbasî bi xwîn û telaqreşî xopan bûn, malmîrat bûn :
Harûnê Reşîd ku ji bijareyên Xelîfeyan bû destê xwe, wlcdanê xwe bi xwîna bêgunehan lekedar kir! Gewremerdê xwe Caferê Bermekî da kuştin. Bermekî ku hem gewremerd û hem hevalê wî bû, ji hogirê rewanê wî bû û bi salan ji bo pêşveçûna xwehermenda Abbasiyan ra ji canûdil karûkoşên zor kiribûn. Harûnê Reşîd ev çend xebat û emekdarî ji bîr kir û bê mihirdadî û bê dilovanî ji kuştina Caferê bedbext û bêguneh ra ferman da. Serê Cafer hat firandln, ji ezbeta wî pir bêgunehên din jî hatin kuştin. Kurê Harûnê Reşîd; Xelîfe Mernûn, Textê şehriyariya xwe li ser cendekê birayê xwe, Emîn, vegirt !!
Gotina dawîn : di 528 salan da, ji Abbasiyan 37 Xelîfe hatin. Ji van 37 Xelîfeyan, bi tenê 9 Xelîfe di nivînên xwe da, bi hêsanî mirin. Ji 28 Xelîfeyên mayîn. 3 Xelîfeyên bedbext çavên wan hat deranîn. kor bûn !!
Ev her sê Xelîfeyên bedbext. di kuçan da, li Bexdê, ji bo kerîkî nan pars kir. bi salan naliyan û mirin. 2S Xelîfeyên mayîn. her yek bi awakî hat kuştin ! Hin ji wan bi dek û planên birayên xwe hatin mirandin.. hin ji wan

bi destên gewremerdên nankor hatin [ehrandin, çend ji wan bi bêdadiya Emîrul-Umera di zindanan da ji tîna, ji birsîna temenê xwe gihand dawiyê!
- 195 -
Ev e dawiya dilkuj a Xelîfeyên Bedbext! Dawiyeke reş û kirêt ! Islam pesn û sitayişên van Xelîfeyan gihandine perê ezmanan, ji bo van Xelîfeyên gendûgemar, genîwer, pespaye û xwînxwar çi efsane û çîrok ber bi hev anîne ! Ji bo wan çi dastina û pesnave û çi bêjelaw (xezel) stirane ! Rastiyê ji gelê nezan veşartine. Rûreşiyên Xelîfeyan eşkere ne kirine ! Ev Xelîfeyên bedbext û kêmbext ku di Serayan da keys û fesal dixist destên xwe, bi gewz û şadî li teniştên gulperiyan, bi xwarin û vexwarin, bi mey û meygeran, bi çerez û mêzeyan, bi lîz û gewendan, bi saz û stran û hayhuyan serxweş dibûn !
Eva ! Vêrastên nivîs warên dîrokan ! Eva ! Ruyên vêrastên Xelîfeyên xudan şan û cî û payeyan ! ...
Em dîroka Kurd û Kurdistanê dinivîsînin. Em dîroka Is lamê, dîroka xanedana Emewiyan û Abbasiyan nanivîsînin. Lê, ji bo Xelîfeyên pêşîn - Xelîfeyên Raşidîn -, yên Emewiyan û Abbasiyan û Xilafeta Osmaniyan ku vê paşiyê, di sedsala 16im da, bi zora şûr ji Ereban gihaştibû Tirkan û 450 sal "Meqami Xilafeti Ulyai Osmaniye" li Istanbûlê paydar bûbû. divê em çend pirsan bibêjin :
Xelîfeyên Islamê ku me berê ji bo wan nivîsandibû li Asya. Afrîqa û Awrûpa, ji bo bilindayiya navê Xwedê, ji bo pêşvebirina Islamê pir kişwer û der û ber vekirandin, welat û bajar talan kirin û şewitandin. meriv kuştin, bilêc kirin, xanûman wêran kirin û vemirandin û ji destdirêjiya namûsa dawpaqijan xwe ne parast. Keç û bûkên perîpeyker wek keriyên tarişan ajotin bajaran, di çarçiyan da firotin.
Te digot qey şeştarî û bêdadiya Ereban ne bes bû. Tirkên Selçûqî, Tirkên Kayhanî jî xwe tevî guruhên talankeran kir. Ji bo riya Xwedê, ji bo ola Peyxember, kujtin, bilêc kirin, şewitandin, talan kirin, dîl girtin, kurên bavan di zindanan da rizandin ... Ev xwînxwarî bi sedsalan dirêj kir ! Nemaza li Balkanan,
- 196 -

li Bulgaran, li Sirban, li Yewnanan ... xwînrêjî û cenawuriyên ku Tirkan çêkirin !!!
Roj roja Ereb û Tirkan bû ! Ji alîkî mal û talan, ji aliyê din jî keç û bûkên dilber ! '" Paşê jî li Seray û baxçeyên buhuştê, horî û periyên bê jimar ! ...
Di van hengamên cangizok û dilherêf da, kopa dijwar li Kurdan xistin : Xelîfeyê duyim ê Islamê, Omer Ibn El Xettab, cenawurî û xwînxwariya dijwar li Kurdan kir. Rûreşî û sermsariyên gijok bi serê Kurdan anîn. Xelîfeyên Emewiyan jî şopa Omer ajot. Xelîfeyên Abbasiyan yekfesal xistin destên xwe û Kurd kuştin û êşandin. Lê, Xelîfeyên Osmaniyan 400 sal tiştê nemayî anî serê Kurdan : kuştin, talankirin, namûsa wan lekedar û paymalkirin, debistan û medreseyên Kurdan hilweşandin, Kurd nezan hiştin. Wan Kurdistanê kir wêranezar.
Ecem jî ji Emperyalîzma Ereban pir êşiyan. Lê kopa dijwar li serê Kurdan ketibû. Ereb kopek ewçend bi bêbavî û dijwarî daweşandibû ku îro 1400 sal e ku Kurd ji hejandina wê pak ne bûne !
- 197 -
STANDINA BEXDA 0 WENDABÛNA ABBASIYAN BI DEST1: HULAKO PADîşAHIY A ISMAîL1: SAF Awî
u SERHATIYA KURDAN
Di sala 1529 P.Z. da, li îranê, Şeyx Ismaîlê Sawafî - ji Ezbeta Hazretî Elî, neviyê Mûsa Kazim, kurê Şêx Sefaeddînê Erdebîlî - ba Şahê Kurdan.
Ji bo ku em bizanin bingeha padîşahiya Safawiyan li bin werêç (tesîr) gertevên bi çi rengî hate danîn, divê em ji standina Bexdê bidestê Hulakû, ji wendabûna Xelîfetiya Abbasiyan û leyandina Mongol, Tatar û Tirkan hinek agah bibin :
Me berê nivîsandlbû, xwehermenda Kurdî ya Peweye = Dîlemiyan di sala 942 P.Z. da li Bexdê bingeha xwe danîbû. Xanedana Dîlemiyan li Bexdê û li tuma Iraq, Kurdistan û Parisistanê 127 sal padîşahî kir. Paşê, ji Tirkistanê Tirkên Selçûq hatin. Mezinê wan, Turxul Beg, di sala 1070 P.Z. da dirêjî Bexdê kir, ordiya Dîlemiyan şikand, Turxul Beg bû Emîrî Umera, ano wek Dîlemiyan ba padîşahê Iraq û Bexdê. Padîşahiya Selçûqiyan 208 sal ajot.
Mîna hengama padîşahiya Dîlemiyan, di dema padîşahiya Selçûqiyan da jî, Xelîfeyên xwediyên tu karmendiyê ne ban. Xelîfeyan bes roja înê li

mizgeftê xutbe dixwend û têkilî tu karê din ne dibûn. Xelîfeyên bê nêrûmendî, bê karmendî û bê xebtûkoş li Serayan û Kaşaneyan bi çeng û saz û aheng, bi meyên reng bireng, bi bejnên selwan û hîvrûqan, bi gulav û misk û emberan, bi xwarin û vexwarinên
- 199 -
www netewe.com
meyxweş gewz 0 şadî dikirin. Bi kamranî 0 şadmanî xweşdem dibûn 0 bi van hawana bedbextî, belengazî û rebeniya xwe ji bîr dikirin !
Dawiya dawîn, di sala 1258 P.Z. da, Xanê Tataran - Neviyê Cengîz Xan - Hulakû Xan dirêjî Bexdê kir, bi ordiya Xelîfê ra şer kir, ew şikand, Xelîfeyê pepûk kuşt 0 kete Bexdê. Bexdê talan kir, bilêc kir, 800.000 bê dilovanî kuştin. ji şûr derbas kirin. Hulakû bi vî awayî "rêkor"a merivkujî 0 xwînxwariyê şikand!
Hulakû Xan, pey vê kamweriyê, di welatê Kurd 0 Farisan da - ji Hindistanê heya Deryayê Reş - bi navê "Ilhaniyan" xwehermendeke Tataran serrast kir.
Hulakû pir jîn ne kir, heft sal bi şûnda mir. Xwehermenda Ilhaniyan pey Hulakû paydar ne bû, vemirî, di nav çend salan da wenda bû.
200 sal bû ku kişwerê Iran - welatê Kurd 0 Paris - di nav geremolî 0 tevheviyê da bû. Weke ku kevanjenek bijene, Imparatoriya Kurdistan hatibû jendin, ji hev bela bela bûbû : asayiş 0 ewleyî ne ma bûn, tukes asûde 0 bextxweş ne bû.
Tatar, Tirkmen 0 Tirk li Iranê - Imparatoriya Kurd û Faris -, Anadol 0 Sûriya çerx dibûn, çaraliyên xwe bilêc dikirin. wêran 0 kambax dikirin !
Ev koçerên Tatar 0 Tirkman 0 Tirk bi milyonan bûn, bê rêzan, bê bendûbest bûn. Gelek caran di navbera wan da jî şer 0 pevçûn hebûn. Xan 0 begên wan tim di nav xwe da qayişkêşî 0 pêşimtî dikirin. Xebtûkoşên van Xan 0 Began hergav talan û kuştin bûn.
Van gurûhên koçer - Tatar 0 Tirkmen 0 Tirk - ji du sedsalan bêtir Iran talan kir, xopan kir. Gava ku tu avayî li wan deran he hişt, êdî tu tiştên talankirinê li van doran ne man, berê xwe da roavayê.
- 200-

Tatar li Gurcistan, Qafqasya û Qirim belav bûn. Tirkmen û Tirk jî kişiyan Anadol û Sûriyê. Li van deveran "Atabegîtî" û "Begîtî" serrast kirin. Paşê, ji van atabegan du xwehermendên mezin çê bûn :
Selçûqî di sala 1078 B.Z. da li Qonyayê xwehermenda Selçûqî ya Rûm saz kir. Tirkên Kayhanî jî ji qelsketina xwehermenda Selçûqiyan keys xist dest xwe, bûn mîratxurên Selçûqiyan û di sala 1300 P.Z. da bingeha Imparatoriya Osmaniyan danî. Di sala 1453 P.Z. da, Istanbûl bû paytextê Osmaniyan.
Di şerê mezin ê 1914 da, Imparatoriya Osmaniyan wenda bû. Di ciyê wê da, tûdevaniya (cumhûriyet) biçûk a Tirkiyê çê bû.
XWEHERMENDA SAFA WIY AN
Di dawiya sedsala 14im da, li Kurdistanê zordestiya Tatar û Tirkan dest bi sivikbûnê kiribû. Tatar û Tirk, ev gurûhên talankeran, pey talankirin û wêrankirina kişwerê Kurd û Paris, ji xwe ra - ji bo talankirinê - li deverne din geriyan. Tataran berê xwe da aliyê Deryayê Reş. Pirên Selçûqiyan jî ber bi aliyê Anadol û Sûriyê koçbar bûn.
Di van hengaman da, ano pey dûrketina Tatar û Tirkan ji Kurdistanê, kurê Şêx Sefaeddînê Erdebîlî, Şêx Ismaîlê Safawî, li aliyê Geylanê şêxê rêol, ano Şêxê Terîqet, bû. Şêx Ismaîlê Safawî paşê bû Şah. Şahîtî çêtirî Şêxîtiyê dît û murîdên xwe, ano cengawe-rên Kurdan, li dora xwe civandin û dirêjî Gurcistanê - Gurcî Îsaparêz bûn -, Satrapdarê Sêrwanê kuşt û satrapa Sêrwan ji Gurciyan stand. Paşê, di sala 1.500 P.Z. da, dirêjî Akkoyunluyan kir, bi wan ra şer kir, padîşahê wan Elwend Mîrza kuşt.
Paş salekê, di 1501 da, dirêjî bajarê Tebrîzê kir, Tebrîz ji Tirkmenan stand û kir paytextê xwe û serxwebûniya xwe bang kir. Şah Ismaîlê cuwan û jêhatî di demeke hindik da Xoresan. Hemedan, Bexda, Diyarbekir û Meraş vekirandin. Pey van

kam we riyên mezin, bû xwediyê xwehermendeke fireh.
Xoresan û Hemedan û he ldorên wan hêj rind û rind ji Tirkên Selçûqî paqij ne bûbûn. Şah Ismaîl bi camê riya xwe van ciyên buhadar ên Kurdistanê ji destê Tirk û Tirkmenan reha kir. Şah Ismaîl bi van kamwerî û xebtûkoşan nîştimanparêziyeke mezin, xebateke hêja çêkir, di rizgarkirina welatê

Kurd û Paris da şabaş û aferîna gelê Îranê giş kar kir û firazdariya xwe nîşan da.
Şah Ismaîl bi xebtûkoş û canfeşanî ceng û şerên din jî kirin, Tirkmen û Tirk ji Kurdistanê deranîn, Kurd û Paris ji bin destê neyaran reha kirin. Wî ji welatê Kurd û Paris ra xebateke hêja û mezin kir, bi van xebtên giranbuha flrazdariya xwe eşkerand.
Muxabin û pir muxabln ! Şah Ismaîl paşê du gunehkariyên çewt û bervaj kirin : 1- Şiîtiyê kire Ola Fermwer (resmî) a Kurdistanê. 2- Mîrlyên Sînedej û Kirmanşahê bi zora şûr ji Mîrên Kurdan standin û kirin bin kargerîniya xwe.
Ev her du karmendiyên (icraat) Şah Ismaîl Kurd sil kirin û ji xwehermenda Safawî sar kirin; êdî baweriya wan ji Safawiyan ra nema.
Di van sedsalan da, sedsalên olbûnê, li her gertevî bi dûrbîna olê dihat nihêrîn. Piraniya Kurd sunnî bûn, şîîtî ne dixwest û ne dipezirand (qebûl ne dikir>. Gava Şah Ismaîl şîîtî kire ola fermwer, Kurd pir tengjîn û dilşikestî bûn û ji Şah Ismaîl dûr ketin. Jixwe mîrên kurd, bi standina Sînedej û Klrmanşah û heldorên wan, li Safawiyan bi çavekî bedgûman û bi dudilî û rengwerî dinêrt. Şah Ismaîl bi pirxwaziya xwe û bi desthişkiya xwe ronak ne dît û kûr bîr ne bir. Loma, her du sûc û gunehên wî ji Kurdistanê ra renc û derdên giran anîn : nêzîkî 50 rruriyen Kurdistanê serxwebûna xwe wenda kir, bi milyonan Kurdên azad bûn dîlên destê Tirkan.
- 202-
YEKITIYA KURD Q TIRK SERHA TIY~N DILKUJ ÊN KURDAN LI BIN DEST~N TIRKAN
Berî ku Şah Ismaîl li rohilatê padîşahiyekê bi cî bîne, Tirkan du sed sal bertir li Anadolê xwehermenda Osmaniyan serrast kiribû. Di hengama Şah Ismaîl da, padîşahê Osmaniyan Sultan Selîm bû. Sultan Selîm bavê xwe ji text anîbû xwarê û, li ciyê bavê xwe, li ser text rûniştibû, xwe kiribû Padîşahê Osmaniyan. Ji bo ku ciyê xwe tebût û xurttir bike, 12 birayên xwe kuştibûn ...

Ji van gertevan pir baş xuya dibe ku Sultan Selîm padîşahekî çavnebar û gellek pirxwaz û xwînxwar bû ! Sultan Selîm bicarek xistibû serê xwe ku bibe cihan gîr û cihanê tevde bixwe.
Sultan Selîm, ji Roava bêtir, çavên xwe berdabûn Rohilat. Kîşwerên vekirandinê li rohilat bêtir hebûn û firehtir bûn !
Li Rohilat, li hemberî Sultan Selîm xwehermendeke xurt hebû. Ev xwehermenda nû û cuwan xwehermenda Safawiyan bû. Şah Ismaîl di van salan da ji destê Akkoyunluyan Diyarbekir, Mêrdîn û Maraş standibûn û xwe g ihandibû sînorên Osmaniyan. Sultan Selîm ji van tevgerên Şah Ismaîl pir Inglrîbû û veherandlbû (qerar stendibû> ku li Ismaîl kopeke dijwar daweşîne û Îran - Kurdistan û Parisistan - gişî jê bistîne. Hêj wêdatir jî, here bibe Iskenderê Mezin, Hindistanê jî vekirîne !
Di vê demê da, di navbera Şah Ismaîl û mîrên

Kurdan da nexweşî 0 tevhevî dest pê kiribû. Mewlana Melle Idrîsê Bedlîsî şîretvanê xurû (xas) ê Sultan Selîm bû. Ew Kurd bû, zana û jîr bû, li ba Kurdan xudan cî û xudan nav bû. Sultan Selîm ev keys 0 wesana (firset) mezin ji dest berneda, xebtûkoşên zor kirin, Kurdên sunnî ji Şah Ismaîl cuda kirin. Mîr Şerefeddînê Bedlîsî 15 sal bi şûnda, di 1529 P.Z. da, ji Şah Tehmaseb Odê (nav) Xanîtiyê stend. Bi halandana Melle Idrîs, ji Sultan Selîm ra çend merivên xwe yên şareza û reşbelek şandin. Mîr Şerefeddîn di reşbe leka xwe da tevgera Şah Ismaîl û leyandin 0 pêşveçûna şîîtiyê dûr û dirêj dida zanîn û ji Sultan Selîm alîkarî dixwest.
Ev qisseya bergiran di Dîwana Sultan Selîm da bi candilî hate peyivandin û, li dawiyê, Sultan Selîm çend Paşayên xwe, tevî Mewlana Idrîsê Bedlîsî, şandin ba Mîr Şerafeddîn.
Şandina encumena ha li Bedlîsê bû destpêka geştecenga şerê Osmaniyan û Safawiyan.
Çendakî bi şûnda, di sala 1514 P.Z. da, Sultan Selîm ji Istanbûlê ordiya xwe rakir, derbasî derya bû, berê xwe da Rohilat. Ji Qeyserî û Sêwazê derbas bû, hat Amasyê. Amasya ji xwe ra kire sernîvek, ano ji ordiya xwe ra kire şergeh.

Mîr Şerafeddîn gellek dorevan (muhafiz) û şerevanên xwe hilanîn, bi Melle Idrîs ra hat Amasyê. Mîr Şeref û Melle Idrîsê Bedlîsî, her du jî, şîretvanên Sultan Selîm bûn.
Sultan Selîm li Amasyayê, bi her du şîretvanên Kurd û bi gewremerd û paşayên xwe, ji bo vê geştecenga bergiran a Safawiyan bi rojan 0 şevan bêjgoyî (muzakere) kirin, rêzane 0 çare giş dan pêşberên xwe, xerşe (xerîte) 0 plan serrast kirin, bi her awayî xwe pêk anî û amadeyên ceng û şer bûn. Bi rêberî û pêşdariya Kurdan, padîşah, ordî, şîretvan û gewremerd ji bo şerê Çildêranê bi rê ketin.
- 204-
ŞERE ÇILDÊRAN (3D
Mîr Şerefeddîn, Mewlana Idrîsê Bedlîsî, Cengawerên mîriyên Rojkan û hezaran siwarên Kurd ji êlên din ên Kurdan ji ordiya Sultan Selîm ra rêberî û pêşdarî kir.
Padîşahên Asoran, padîşahên zorker û nêrûmend, bi sedsalan bi Kurdan ra şer kir, wek leyiyan xwîn rijand, lê nikaribû ji van geliyên kûr û teng, ji van kaş û hevrazên tund û şîp derbas bibin. Du hezar sal deriyên Kurdistanê ji padîşahên cihangîr ên Asoran ra hiş û biring girtî man. Paşê, Asor bi destê Kurdan wenda bûn. Asor ne gihîştin vê armancê, bê mirad mirin, ev kul û birîn di zikê wan da ma. Lê, ev derên Kurdistanê ku du hezar sal ji padîşahên Asoran ra girtî mabûn, ev çiyayên bilind û dijwar ku Ksênofonê Yewnanî nalandibû, derdnag û perîşan kiribû, ji Sultan Selîm ra bi xahiş û dilxweşî, şayî û şadmanî vebûn. Sultan Selîm bi ordiya xwe va, barxwane û giraniya xwe va ji van derbendan, ji van geliyên kûr, ji van çiyayên tundûşîp bê serêşanî, bê tengahî derbas bû!
Padîşah û giregirên dora wî, paşa û leşkerên wî, hesp û olaq û topkêşên wî, evçend bê jimar enzan û çarpê bûbûn mêvanên Kurdistanê. Kurdistan, bi cameri u comerdî, mêvandariya xwe bi cî anî. Bi xwarin û vexwarinên mêzxweş û çeşnîşîrîn xanên şahînşahî rast kirin. Di derbasokan da, herkes, mezin û biçûk, bi çepikan û lîlandinan pêşçûyiya mêvanên xwe dikir.
Geştecenga ha dirêj kir, hevraz û nişîvên Kurdistanê, çiyayên şîn û bilind ên serkişandî li ezmanan sergihandî ne diqediyan. Çendakî bi şûnda, ew

gihîştin bajarê Beyazîdê, û paşê berê xwe da rohilatê bakurr û riya xwe ajot. Çend roj bi şûnda, serê slbakê zû, li pêşiya wan, li palên hemberên wan şergeha Şah Ismaîl xuya bû. Ev der deştika Çildêran bû.
- 205 -
Sibetirê, bi rohilat ra şer dest pê kir : her du alî jî, di destpêkê da, bi siwariyan dirêjî hev kir. Şerevanên her du ciyan bi mêranî cengine zor kirin. Di miqlacî û mêrxasî û hunerweriyê da tu kêmanî ne dihişt.
Di dawiyê da, Şah Ismaîlê Safawî di meydana şer da birîndar bû. Merivên wî bi zor ew revand. Ordiya wî şkest, ji hev belav bû. Şergeha Şah Ismaîl, tevî jina wî "Tach Hanlm", bicarekê ket destê Osmaniyan (32).
Sultan Selîm 13 roj bi şûnda, bê teqereq, bê şer û pevçûn kete Tebrîzê, paytextê Şah Ismaîlê Safawî. Sultan Selîm çend roj li Tebrîzê ma, paşê vegeriya Amasyayê.
CIVANA SULTAN SELîM Q MîRî:N KURDAN LI AMASY A Yî:
Sultan Selîm, pey vegera xwe ji Tebrîzê, li Amasya bi reşbelekan mîrên Kurdan xwandin (dawet kirin). Bi halan û zirtên Mewlana Melle Idrîsê Bedlîsî, 28 Mîrên Kurdan hatin Amasyayê. Di dîwana Sultan Selîm da, bi rojan civiyan, hûrik hûrik peyv û gotin hilanîn û danîn û teqilandin. Li dawiyê, 28 mîrên Kurdan bi zimanbaziya Mewlana Melle Idrîsê Bedlîsî û xweşgotin û şêrînpeyvên Sultan Selîm bawermend bûn, û di navbera xwe û Sultan Selîmê Osmanî da yekdestî danî û ji Şah Ismaîlê olşîî dûr reviyan. Padîşahê Osmaniyan, Yavuz Sultan Selîm, û 28 mîrên Kurdan li Amasyayê, di sala 1514 P.Z. da, yekdestînaveyek şeqil (mohr> kir.
Ev yekdestînave ji sê Bendan pêk hatibû :
1- Mîrên Kurdan di erdê xwe yê bav û bavpîrên xwe da, bi serxwebûniya tumî, gerdiş (adet) û rêzanên kevnare yên xwe dê biparêzin. Mîrîtiya wan. wek rêzanên kevn ên berê, dê ji bav û dê bigihîje kurr.
- 206-
2- Mîrên Kurdan, parazvanên sînorên Kurdistanê ne. Eger xwehermenda Osmanî bi xwehermendeke biyanî ra şer bike, Mîrên Kurd siwarên xwe yên çekkirî û karûbarkirî dê bişînin alîkariya padîşah. Leşkerên Kurd di bin Fermandarên xwe yên Kurd dê şer bikin. Eger xwehermendeke biyanî

dirêjî Kurdistanê bike, xwehermenda Osmanî, bi ordiya xwe, dê bê alîkariya Kurdistanê bike.
3- Mîrên Kurdan her sal, bi navê diyarî, hinek dirav dê bidin kenza Osmaniyan.
SERHA TIYÊN KURDISTANÊ PEY YEKDESTIYA AMASY A
Sultan Selîm, bê west û bê xwînrijandin, bi xebt û jêhatdariya Melle Idrîs, bû xwediyê Kurdistana rengîn.
Sultan Selîm ji vê kamweriya hêja û bê buha pir gezdar û dilxweş bû. Mîrên Kurdan jî ji yekdestiya xwe û padîşahê Tirk Û Sunnî gelek dilşa bûn. Hezaran muxabin ! Van mîrên bedbext nizanibû paşê dê çi bê serê peyhatiyên wan ! Melle Idrîs û 28 mîrên Kurd bi destên xwe çi mal mîra tî anîn serê gelê Kurd ! Van mîrên bedbext bêbavî, bêbextî Û nankoriya Tirk nizanibûn ! Wan ne dizanîn ku rojek wê bê, padîşahên Tirkan û Sedirazamên wan û Talat Paşan, Enwer Paşan, Mustafa Kemalan, Ismetan, Celal Bayaran ... dê çi bînin serê Kurdan!
Van mîrên nezan û çavnetêr, Melle Idrîsê şeqlevan nizanibûn ku Tirk 400 sal bi bilêckirin û kuştin û zindan û talan û agir ... dê Kurdistana nazenîn wêran bikin.
Şah Ismaîlê Safawî ji bêfehmiya xwe û bi hişkbawariya xwe ya olî, ano "Şîîtî", perçake mezin û bergiran û hêja ya Kurdistanê wenda kir.
Yavuz Sultan Selîm, bê serêşandin, bê şer û xwînrêtin bû xwediyê Kurdistana fêris.
- 207 -
Paşê, Sultan Selîm Kurdên cengawer li sînorên rohilat kire parazvan û bi bawermendî, ewletî û asûdegî dest bi vekirandina Misrê kir.
Bi derjê (netîce) vekirandina Misrê, "Parazgeh"ên Islamê, Mekke û Medîne, ketin destê Sultan Selîm. Sultan Selîm gihîşt payeya bilind a xilafetiyê û pertaw û tavdariya xwehermenda Osmanî gihande felekan. Di gihîştina Osmaniyan vê serfirazî û mezinayiyê da, Kurdan rolên bê awa lîstine û alîkariyên hêja kirine.
Kurdan, di hengama Yavuz Sultan Selîm û kurê wî Qanûnî Sultan Suleyman da, di meydancengan da : vekirandlna Misrê, girtina Belgradê, şerê Muhaç ê xwînî, cenga Bûdîn, dorpêça Viyana ... xebtûkoşine dijwar

kirine. Kurdan, di van şeran da, bi mêranî, hunerbazî û cengaweriya xwe navûdeng birine. Mîrên Kurd, Cengawerên Kurd, ji bo Ol û Xwehermend, ji bo Padîşah û Xelîfetan, bi dilekî paqij, bi merdî û mêrxasî, wek çeman xwîna xwe rijand. Kurdan di dîroka Osmaniyan da roline hêja lîstin. Kurdan mêrine kêrhatî dane xwehermenda Osmanî: sergewremerd, gewremerd, zana, weş best û fermandar ... Kurdan bi milyonan kurên xwe di riya Padîşah û Xelîfeyan da kirine gorî !

Kurdan 450 sal bi Tirkan ra evçend canfeşanî kiriye, ji bo wan evçend koşiyane, xebitîne. Lê, li hemberê evçend xebtûkoş çi gihîştiye destên wan ? Malmîratî û zebûnî !!

WENDAKIRINA MIRIY1:N KURDAN BI DESTÊ TIRKAN

Mîrên Kurdan, gava ku di sala 1514 P.Z. da li Amasyayê bi Yavuz Sultan Selîm ra yekdestî danî, wer bawermend bûn ku mafên ferweraniya xwe, serxwebûna xwe, avrû û ewlemendiya xwe xistin bin girewê.

Efsûs ! Ev bawermendiyên wan giş pûç derketin ! Kurd bûn goriyên şapînozî û xap û bêbextiyên Tirkan.

Hêj ji yekdestiya Amasyayê nîv sedsal derbas ne bûbû ku Padîşahên Tirkan ji ber xwe hezar behane çê kirin û Mîriyên Kurdan ên serbixwe yekayek wenda kirin.

Kurdê sera zad ji hezaran salan ve, di hengama Sûmîr, Akad, Hittît, Kildan û Asoran da, her dem ji bo serxwebûn û azadiya xwe can da, xwîn rêt. Kurdan îcar jî ji Padîşahên Osmaniyan ra bi hêsanî serfirû ne kir. Kurdan, li pêş ordiyên Padîşahên Osmaniyan mafên xwe yên awist (meşrû) bi mêranî û canfeşanî qedxen (rnudafaa) kirin. Nemaza di van 50-60 salên dawîn da, ordiyên padîşahên Osmaniyan, ên "Jon TUrk"an û yên "AtatUrk"an bi çekên "Modern" ên her reng û her celeb karûbarkirî bûn : top û tivingên lezagir, hawun û bombavêj û mîtralyoz, tank û balafir ... Tirkan, bi van çekên dijwar, bi van çekên agirrêj û mirinrêj dirêjî Kurdan dikir. Kurdan, bê tirs û lerz pêsîra xwe dida ber gulleyên topan û berikên tivingan; pir caran bi tena şilfên xenceran li Tirkan vedigeriyan, wek pilingên ingirî êrîş dibirine wan ! Kurdan şerine bê umîd dikirin! Xwe dida kuştin, xwîna xwe dirijand, ji bo Kurdistanê xwe dikir gorî !

Li Kurdistanê 400 sal şer û ceng û şebxwîn sar ne bû ! Kurdan, ji bo serazadiya xwe, ji bo serxwebûna nişтimanê xwe yê pirflraz, ji bo rizgariya Kurdistana şêrîn ji destê Tirkên nankor û bêbext, bê tirs û endûh, xwe diavêt ber mirinê, nişтimanê xwe yê giranbuha gav bi gav, bihust bihust qedxen kir. Kurdistan seraser bi xwîna rewanpakan hat sitirandin !

DîLKETINA KURDISTAN

Divê em vê yekê, divê em vê rastiyê bizanibin Kurd ji çekên Padîşahên Osmaniyan, Jon Tirkan û

- 209-

AtatUrkan bêtir bi zexelî <*), bi nîrengî (desîse) û komployên wan şikiyan !

Tirkan, li Kurdistanê, ji Şêx û Mel1eyên afsûnker, bawervaj, çavnetêr û nezan hevalbend ji xwe ra ber bi hev anîbûn (33).

Pir caran, van Şêx û Melleyan, van kurtîlxuran, Mishefa Pêxember digirt destên xwe, dikir mertal, xwe digihand kel, çeper û baruyên Kurdan; ev burc û baruyên ku carê ne ketibûn destên tu xwehermend û neyaran. Van Şêx û Mel1eyên nizmpaye û bêbext ev sargeh û burc û şatoyan bi Mlshef û sond û selawatan ji destên cengawerên Kurd derdixistin û didan destên Tirkan, ev Tirkên neyarên malbat û bingeha Kurd !

Van Şêx û Mel1eyên bawervaj û nezan û bedbunyad, bi ayetan, bi hedîsan, bi tifuyên şêx-islam û miftiyan Kurd dixapandin, Kurd didan bawer kirin ku kesê ku di nixûna Xelîfeyê Islamê da şer bike dibe bêbawer û bêol û rasterast diçe dojehê. Van Şêx û Mellan, bi van fend û fûtan, bi van flrîb û zexeliyan çekên ku Kurdan pê maf û serxwebûn û namûsa xwe qedxen dikirin bi givaja Mishef û ayet û hedîs û tifû jê digirtin, radestî (teslîm) Tirkan dikirin !!

YENI ÇERI Q AKINCI

Tirk, hîn rasttir, Mongol, Selçûq, Kayhan, Tatar û Tirkmen, gava hatin Kurdistana bindestê Abbasiyan, pûtparêz bûn. Wê gavê - di sedsala Him û 14im P.Z. da - hêj ne ketibûn Ola Islamê. Paşê bûn musulman. Ji rêzanên bingehî yên Islamê, yek jî "Cihad" û "Xezû", ano "kuştin" û "talan" e ! Ev bîrok (madde) pir bi endaz (muwaftqlê Tirkan bû, bi tumî bi keys û fesala wan bû. Em dikarin bêjin ku Tirk ji bo van her du pirsan, ano "Cihad" û

"Xezû", hîn çêtir, em bêjin ji bo "kuştin" û "talan" Musulman bûn! Ev Ol ji bo Tirk û Tatar û Tirkmenên talanker û xwînxwar pir bi kêr hatibû. Ev Ol
- 210 -
bicarek di endazê xuy û peykerên van barbaran da ba !
Tirk, gava ban musulman, xwest.lbûn ku ji vê olê ra behremendiyeke zor bikin. Tirkên Osmanî, ji bo ku bigihîjin armanca xwe, du sazmanên (teşkîlat) şigevtwer (ecêb) anîn meydanê. Lê, li cihanê, li tu ciyan, li ba tu xwehermendan, wek vê sazmanê tutiştê sosret û şigeft û barbar ne hatiye dîtin :
Yeni Çeri Ocagi ! Akinci guruhu !!
YENI ÇERI
Leşkerên Yeni Çeri bi sedhezaran ban. Tirkên Osmanî ji berhevkirina Yeni Çeriyan ra "Devşirme usulu" digot, ano "Rêzana berhevkirina kurên Fillan".
Ji bo berhevkirina kurên Fillan, her sal bi hezaran leşkerên tirk êrîş dikir bajar û gundên Ulah, Bulgar, Sirb, Yewnan ... - ev kişwerên han di van deman da dîlên bindest ên irkan ban - û cuwanên 14-15 salî bi zor û bi stemkerî didan hev, ji himêz û pêsîrên dê û bavan cuda dikirin û mîna keriyên tarişan didan ber xwe û diajotin, dibirin Istanbûlê. Paşê, ev ciwanên bedbext li leşkergehan dadikirtin. Berî her tiştî, bi lezûbez, hosteyên mîzokbir (sunnetçî) dihatin, kirîvanî datanîn, kurên fillan "pak" dikirin. Piştre, ev reben û pepûk radestên meHan û suxtan dikirin û Ola Islamê di guhên wan da dixwend!
Ev cuwanên bedbext bi stemkerî û bêdadî û zorbazî ji hlmêz û pêsîrên dê û bavan, ji ol û bawerî, dêr û welatên wan cuda dikirin; êdî heya mirinê, mal û ezbet û jin û jinkirin nabînin ! Ev xortên bedbext, ji vir pê da, bihna xweş û germ a paxi1ên dê û bavan napêjinînin, tu dengên şêrîn û nuwazişker nakeve Qer guhên wan ! Ji bo van bedbextan, ji ezmanan nefrîn bariya ! Ji dê û bavan, ji naz û nazeniyan bêpar man ! Pir dar ketin ji îro bi şan da, bextiyarî û kamranî ji wan ra ne ma ! Ev
- 211 -
bedbext êdî bûn Yeni Çeri 0 çûn ! Ev êdî ne enzan in ! Ev êdî enzanîtî, dilovanî, mihrivanî nizanin ! Ev êdî leşkerê Tirk in ! Ev ji vir pêda kuştin,

talankirin, şewitandin 0 wêrankirinê zanin. Ev pasivanên Ola pirfiraz 0 pirpîroz a Islamê ne ! Ev pasivanên Xelîfe 0 Padîşah in. Ew dê "Cihad" 0 "Xezû" bikin, "Xenîmet"an dê bidin hev ! Welatan tarac <talan} bikin. Ew dê kişwer 0 bajaran vehirînin, welatan bistînin, talan bikin, keç 0 bak 0 xortan dê dikin dîl, di bajaran da bifroşin ! Ew dê hêj pêşdatir herin; ev çend xwînxwarî, gend 0 gemarî, genîwerî ne bes e ! Ew dê birîndaran, dîl 0 girtiyan serjêkin, bi dar vekin, singan bi wan da bikut.in, mêran di sîtilan da bikelînin, zarok 0 keç 0 kurran di kadînan da tije bikin, gaz lêkin 0 agir berdinê. Ew dê çêliyên bê guneh bişewitînin! Ev êdî bOn cenawur, bûn yeni çeri, bûn eskerên Tirk !!

GURUHÊ AKINCIY AN

Akmci pêşdarên ordiya Osmaniyan bûn. Akmci bi tu rêzan 0 rêdaran ne girêdayî bûn. Ev sazman ji yê Yeni Çeriyan hovnaktir 0 barbartir bû, Ev çend hezar siwar bûn, ji serserî 0 mirarker 0 hovên derûberan 0 ji kurtîlxuran hatlbûn hevdan.

Gava ordiya Padîşah diçû cengê, van serserryen cenawur 0 gûncenawur pêşdariya ordiya Osmaniyan dikir.

Ev bedxuyên merivxur, gava ku diketin erdên neyaran, ji her mirdarî 0 çepeliyê ra destûrdayî bûn, ji tu gunehkarî, ji tu gendgemarî 0 genîwerî berpirsiyar ne dibûn. Ji bo wan, her bedkerî 0 mirarkerî 0 tevgerên kirêt fêhil (helal) bû ! Gava Akmci, wek gurên har 0 devbixwîn, bi zûrîn 0 qêrînan diketin bajar 0 gundan, herkes hebûnên xwe dihiştin, bi tirs 0 heras, bi girîn 0 nalîn bazdida 0 direviya, canê xwe yê şêrîn reha dikir.

Bedbextên ku nlkarlbûn birevin diketin destên van xwînxwar 0. cenawurên ku sorseteyên giran, bi awayên dijwar, dianîn serê van belengaz û rebenan û ew işkence dikirin : kal 0. pîr û ciwan ne digot; kî biketa destên wan serjêdikir, bi satoran perçe dikir, dikişand çarmixan û sing dikir, agir berdida û dişewitand ...

Nemaza, van Akinciyên bê şerm 0. bê wijdan di destdirêjayiya namûsa jin û keçan da tu bêbavî bi şûnda ne hişt. Van Akmciyên bedbunyad 0. genîrewan, bê êşa wijdanî, zarokên heft, heşt salî jî lekedar 0. berbat dikirin ...

Dawiya dawîn, pey evçend xwînrêtin, rûreşî 0. stemkarî, talan 0. yaxmadest pê kir : Akmci berî hertiştî Tirk e, ano talanker e ! Rewan û bunyadê Tirk talankerî ye ! Tirk, berî hezar sal, gava Tirkistan berda 0. koçbar bûn, berê xwe da roava, armanca wan talankerî bû, Tirk, ji bo tarac 0. talanê, ciyê xwe "Tirkistan" hişt, ber bi roava hat 0. bû bobelata serê Kurd û Kurdistan û hezar gel û hawişên din ! Kurdistan û hezar kişwerên din wêran kirin.

Belê, Akmci berê hertiştî Tirk e ! Berê dikuje, namûsa dawpaqijan lekedar dike û paşê jî dora talanê tê : Akmci ji hûrûmûrên giranbuha, ji gewher û zêr û zûvan çiçend ku karibe hilgire diavêt pişta xwe 0. agir berdida xanûmanan û dlçû. Li paş xwe merin, agir, şîn, girîn dihişt, panî dida hespê xwe û diqeştiya 0. diteqizî !!

Padîşahên Tirk ku hem Padîşahî dikir, hem jî Xilafetî diajot û li ruyê erdê cînişê Xwedê bûn, li ser postê Pêxember rûnlşttbûn, şalika Pêxember li xwe werklribû, neyartiya Kurdê islam dikir û xwîna wî vedixwar!

Ev Padîşahên Tirk ên bedbunyad, ku ji wan ra Emîrulmuminîn dihat gotin, ji bo tarackirina mafê Kurdê stemkêş, ji bo bicarek ji ruyê erd rakirin û wendakirina yekdest 0. destbirayên xwe yên doyîn,

vî Kurdê camêr, mêrxas û musulman ji tu kirêtî û çepelî, ji tu çewtgerî û fend û fûtên xwe şûnda ne dida!

Ev Padîşahên zorba, xwînxwar, bêbext; û paşhatiyên wan ên kirêttir û xwînxwartir - Talat, Enwer, Mustafa Kemal, Ismet, Celal Bayar ... - ji bo ku Kurd li cihanê nabedîd bikin, ji bo ku ji nav û dengê Kurd tu nîşan nehêlin, ji top û tiving û tangên xwe pêva, bi ayet û hedîs Û fituyan jî neyartiya Kurdan kir, tiştê ku ji wan hat ne hêvişand (teqsîr ne kir) !

Nuha, ji bo piştekdan (teyîdra engişên xwe, nivîsandina zanayê Rûsî yê bêalî, Alexandre Jaba, em dê li jêr rast bi rast binivîsînin, em dê dawîna vê qissê bînin :

"Berî ku Kurd xwe bigihînin Tirkan, li Kurdistanê pir debistan hebûn. Wan, li vir, ji zan iş ra pir berxwarî (qabiliyet) nîşan dida. Li Kurdistanê, li her bajar, bajarok û gund 1, 2, 3, carna jî bêtir debistan hebûn. Debistan di bin parastina ferweriyê da bûn. Li Kurdistanê zaniş û pîşewerî (senet) pir

buhadar bû : li Cizîr, Amedî, Soran, Sêêrt, Bedlîs, Diyarbekir (Amed) û gelek ciyên din xwendegehên payebilind hebûn. Ji bo standina giwahnave (şehadetname) divabû xwendevan ji 12 zanewerî azmayiş (Imtthan) bibin.
Gava Kurd ketin bin destên Tirkan, debistan kêm bûn, xwendegeh û xwendevan gelek kêm man. Dibe ku hebûn û tunebûna wan êdî xuya ne dibû".
PADYŞAHIYA SAFAWIYAN PEY ŞERt: ÇIlDt:RAN Şah Ismaî1ê Safawî, pey şkestin û perîşaniya şerê Çildêran, deh salên din padîşahî kir. Di sala 1524 P.Z. da temenpayan bû.
- 214 -
PADIŞAHIY A TEHMASEBÊ YEKIM
Pey mirina Şah Ismaîl, kurê wî Şah Tehmasebê yekim bû Padîşah.
Şerên ku bi Padîşahê Osmaniyan, Sultan Suleymanê Qanûnî, kurê Yavuz Sultan Selîm, ra kirin, di gişan da şkest : Bexda û Wan wenda kirin.
Şah Tehmaseb bedsezayê (ceza) bavê xwe kişand. Pir ne ajot, temenpayan bû.
PADlşAHIY A ABBASÊ YEKIM
Şah Abbasê yekim Padîşahê çarim ê Safawiyan e. Şah Abbas, di hengama Padîşahiya xwe da, çend kamwerî bi dest xistin : li aliyê Kurdistana roava û li aliyê Qefqasê sînorên xwe fireh kirin. Tirkên Ozbekistan ji aliyê Xoresanê hin cî standibûm ev cî ji Ozbekan vegerandin. Ji bo geş 0. gumhurî û avayiya kişwerê xwe xebtûkoş kir. Şah Abbasê yekim jêhatîtir û hêjat.irê Şahên Safawiyan e.
PADlşAHIYÊN ŞEŞ ŞAHÊN BÊKÊR
Di hengama şeş şahên ku pey Şah Abbasê yekim ra hatin tu huner ji wan çê ne bû. Demên her şeşan jî vemirokî 0. çilmisokî derbas bûn.
Paşê Padîşahiya Safawiyan ket destê Nadir, Nadirê Tirk : di 1732 P.Z. da, di hengama Tehmasebê duyim da, sergerdekî Tirk peyda ba, navê wî Nadir ba, ji ala Havşar bû û kurê şivanekî bû.
Nadir 6.000 meriv gihandin dora xwe, dirêjî Xoresanê kir 0. bajar stand, li wan doran bû ferweran.

Di vê hengamê da, Afganistan dirêjî Safawiyan kiribû û pir ciyên wan xist.ibûn bin destên xwe. Tehmasebê duyim ji Nadlrê sergerde gazî xwest. Nadir hat hawara Tehmaseb 0. bi Afganiyan ra şer kir û ew şikandin, da dû wan 0. Afganistan seraser vekirand.

- 215 -

Nadir, pey vê kamweriyê , ûdê Tehmaseb Kulu Han stend û bû gewremerd û şîretrnendê Şah.

Lê, gava Nadir (Tehrnaseb Kulu Han} ji Afganistanê vegeriya, Tehmasebê duyim ji Text anî xwarê, ciyê wî da Abbasê duyim ê heşt salî û evê dawîn kire şah. Abbasê duyim di 1735 da temen payan bû.

PADIşAHIY A NADIR ŞAH

Nadir Şah di sala 1735 da li ser Text rûnişt, ordiyeke mezin berbihev anî û Afganistan û Belûcistan vekirandin. Di sala 1799 P.Z. da, dirêjî Hindistanê kir. ordiya Gurganyan (neviyê Tlmurlenk) şikand 0. bajarê Delhî vekirand, talan kir, tiştine zor giranbuha standin û vegeriya Iranê. Pertew û nêrûmendiya kevnare ya Iranê vegerandin.

Lê, Nadir Şah ji fêhma xweşgerînî pir dûr ba, stemker û bêdad bû, Loma, kargerîniyeke hêja ne bir serî, ji bedgerîniya (sûî idare) xwe Kurd ji xwe xeyidandin. Kurdan şoreş rakir. Nadir Şah leşkerên giran bi ser Kurdan da şandin. Lê, hêj ne gihîştibû meydana şer, temenpayan bû. 1747 P.Z.

Nadir Şah bîst sal Padîşahî kir. Ji ezbeta Nadir Şah çar Padîşahên din hatin. Lê, ji van Padîşahan yek jî ji zebûniya welêt ra tu çare ne dît. Gelê bedbext 0. perkende ji tevheviyê pak ne ba, jîneke asûde ne dît!

Paşê Kerîm Xanê Zendî rabû, di 1760 P.Z. da Tac 0. Text ji Nadiriyan standin.

PADYŞAHIYA KERIM XANÊ ZENDI

Kerîm Xan Kurd bû. Ji êla Zend bû. Di 1760 P.Z. da Padîşahî ji destên Nadiriyan derxist, bû Padîşahê Iranê. Bîst sal bi kamwerî Padîşahî kir.

Kerîm Xanê Zendî zanişmend, pîşewer û hunermend parastin. Ji pêşveçûna çadvanî û bazirganiyê ra pir

- 216 -

guh dida. Bajarê Şîrazê kiribû paytextê xwe, ew pir xemiland û fireh kir, di dadmendî û gumrehgeşiyê da hişt. Di 1780 P.Z. da ji vê cihanê koçbar bû.

Di pey Kerîm Xan ra, Zekî Xan, Sadiq Xan 0. Elî Murad Xan padîşahî kir. Lê, pir muxabin ! Her sê Xan jî wek bavpîrên xwe jêjatî 0. kêrhatî derneketin, qelsî kir, pejmurde ban, padîşahî ji destê xwe revand. Padîşahî di 1796 P.Z. da gihîşte Kacaran.

PADîşAHIY A KACARAN

Qacar Tirk ban. Êleke mezin a Tirkan ba. Di sedsalên 12im û 13im da, gava Tataran Tirkistan leyand, Kacar ji ber Tataran reviyan, hatin roavayê Asya. Ji Xoresan ta hundirê Sarya belav bûn. Gava di 1518 P.Z. da Şah Ismaîl bingeha xwehermenda Safawiyan danî, endişîbû (fikirî) ku êla Kacar di ceng 0. leşkeriyê da jê ra bi kêr bên. Loma, ji Kacarên Tirk bi jimareke pir anîbû dora Tehranê 0. dabû rûniştandin. Di sala 1796 P.Z. da, serekê van Kacaran, Aqa Muhammed, serdestî li Ezbeta Zendiyan kir û li ser Textê îranê rûnlşt , Ano, Kacarên koçer bûn xudan Tac 0. Textê Kurdistanê!

PADîşAHIY A XANEDANA PEHLEWî

Di sala 1925 P.Z. da, yek ji efserên ordiya Kacaran, ku navê wî Riza Xan ba 0. ji êla Mezindiran a Kurdî bû, wergerkeke leşkerî çêkir û dawiya Xanedana Kacaran anî.

Riza Xan xanedaneke na, xanedana Pehlewî sazimand kir. Navê Ecemistan jî kire îran 0. şahîtiya xwe bang kir.

Riza Xanê Pehlewî bi avêtina Kacaran tenê qîma xwe ne anî. Di hengama Kacaran da, Ecemistan ne xwehermendeke sezawar a van sedsalan ba. Ecemistan kişwerekî gelek şûndamayî bû, di nav nezanî 0. çewtbaweriyê da payan baba. Riza Xanê Pehlewî ji

bo pêşveçûna Îranê û "modernîzekirina" Îranê pir xebitî. Ji aliyê leşkerî, zanişmendî, şehrevaniyê pir wergerkên hêja bire serî. Lê, Riza Xanê Pehlewî kêmaniyeke pir mezin, sûcekî pir giran, gunehekî bê senc û pîvan kir ! Bêdadî, stemkerî û dijwariyên pir hofnak di ni xûna Kurdan da çêkirin : wî ew kuştin, talan kirin, dûrandin, perîşan kirin ...

Em vê kisseyê naxwazin ducarînin, kula kûr û noyên dilê xwe nû bikin. Lê, em hêvîdar in, niyaz kar û bendewar in ku kurrê Riza Xanê Pehlewî, Şahînşahê Îraniyan ê îro baş bîr bibe û sûda (mana) pirsa Îranê rind fehm bike : Îran Kurd û Paris e. 90% Kurd + 10% Paris = 1 Îran e. Padîşahiya Paris + Padîşahiya Kurd = Şahînşahiya Îran e.

KURDIST AN Û MÎRÊN KURDAN

DI BIN DESTÊ ŞAHÊ SAFAWIYAN DA

Çawa ku me di kisseya Xwehermenda Safawiyan da nivîsandibû, Şah Ismaîl bi dilîrî û xebtûkoşên "mirîd"ên xwe yên Kurd li Tebrîzê li Textê Şahiyê rûnişt. Lê, gava Şah Ismaîl bi xwîna Kurdan bû xudan kişwerekî fireh û ji Tebrîzê heya Meraşê xist bin destê xwe, êdî xwe ji bîr kir ku di Kurdistanê da Şahê Kurdistan e. Paşhatiyên wî jî bicarek ne anî bîra xwe ku tacê Kurdistanê danîne serê xwe, li ser textê Kurdistanê rûniştine û dest bi terraneyên (nexme) Paris û Ecem kirin.

Çi gelê kurd, çi jî mîrên kurd guh da vê guhartinê. Kurdan Paris ji xwe cuda ne digirtin, Paris ji xwe dijimartin. Ma bi hezaran sal welatê Paris ê biçûçik ne perçeke Kurdistana gewre bû ? Bi hezaran sal, ji Asor û Kildan û ji neyaran kê Paris diparastin? Jixwe ev dem ne dema gelîtiyê bû. Loma, di hengama Şah Ismaîl da, Kurdan li terraneyên Paris û Eceman tu giranbuhayî ne dabû. Lê, li dawiyê, kisse guherî, bû awakî din û derket meydanê. Şah Ismaîl dest bi dexisandina Mîrên Kurdan kir, xwest

ku Kurd 0 rruren wan ji meydanê rake. Loma, kisseya şîîtî 0 sunnîtiyê geş kir, şîîtî kire ola xwehermendî 0 bi vî awayî Kurd 0 Paris ji hev cuda kirin. Ji cudabûna her du birran xwehermenda Safawiyan qels ket. Ji vê qelsiyê Şah Ismaîl jî têra xwe renc kişand. Kurdistana roava, ji Tebrîz heya Meraşê, wenda kir. Bi ser vê jî jina xwe Tach Hanim li ser kir, da destê Tirkan, destê neyaran. Endîşeya wî ya bi salan ku sazmendiya imparatoriyeke mezin bû ne çû serî, pelişî, bû leylaneke derewîn 0 vemirî. Ji aliyê din jî, Şah Ismaîl 0 paşhatiyên wî, ano Nadirî 0 Kacar, li gel perîşaniyên xwe, li gel şkestina xwe li ber Osmaniyan, ji kirêtî 0 nebekariya xwe şûnda ne diman. Wan Kurd 0 Mîrên Kurdan ne dievînandin. Li gel vê yekê, çepelî 0 stemkeriyên Safawiyan 0 Şahên din

wek stemkeriyên Osmaniyan ne bûn. Li Kurdistana rohilat danişmendî 0 avadanî hindê Kurdistana roava nizm ne ketfbû,
- 219 -
DI SEDSALEN 19im Q 20im DA, KURDISTANA ROAVA
HENGAM:E:N SULTAN HAMID, JQN TURKAN Q MUSTAFA KEMAL
Padîşahên Osmaniyan û Sadr Azemên wan, Paşayên van Padîşahan û peyhatiyên wan : Telat, Enwer, Cemal, Mustafa Kemal, Ismet, Celal Bayar ... bi topan, bi tivingan, bi tang û balafiran û bi fen û fûtan, bi bêbextiyên rengareng Kurdistana roava ya rengîn di 400 salan da seraser kir wêrane zar 0. Kurdên bahadir kirin dîlên bin destê xwe.
Padîşahên peymanşiken ên Osmaniyan, ku bi Mîrên bijare yên Kurdan ra bi Peyman û şeqil û naviş 0. bazaran û bi ferman 0. sondan yekdestî danîba, bi bêbextî ev mîr ji meydanê rakirin.
Belê, Padîsahên xudan Tac 0. Text, Sadr Azam 0. Paşayên bi paye 0. nav, bê şerm 0. bê fedî, namûs û rûmetên xwe firotin ! Peyman û sond şikandin !
Mîrên Kurdan ku bi "peymannave"ya Amasya yekbend û yekdestên Padîşahên Osmaniyan ban, bi vî awayî, ano bi bêbextî 0. bi bêdadî ji meydanê hatin rakirin! Bi milyonan Kurd bê xwedî, bê serî, bê mezin man. Ji vir pêda, Paşa 0. Walî 0. Qadî ... û bendekarên (memûr) zorba û bêdad, ku ji Istanbûlê - vê paşiyê ji Ankara jî - dihatin şandin Kurd, Kurdên bedbext, bicarek di bin fermanên wan da mabûn,
Paşa û bendekarên zorba bitenê bi du ustubarên {wazîfe} bergiran kariwer dibûn berhevkirina
- 221 -
leşker Û ya dirav ! Di vê navê da, bendekarên çavnetêr bi kisseke din a bergirantir kariwer dibûn: dagirtina bêrîka xwe !
Asayişa Kurdistan, tendurustiya gelê kurd, çandevanî, bazirganî, pîşewerî, nemaza zanişwerî ne dihatin bîra tukesî.
Jixwe, di van sedsalên dawîn da, imparatoriya Osmaniyan xurtî û gûrîpaşiya xwe wenda kiribûn :
Cezayir, Tûnis û Misr ji destê Osmaniyan derketibûn. Romanya, Macar, Qaradax, Yewnanistan, Bulgaristan giş bûbûn Padîşahiyên xudan

serxwebûn. Di 1879 P.Z. da, ordiyên Ilrlsan ji rohilat, ji Qafqasan, derbas bûbûn û Erdehan, Qars û Ezerom girtibûn. Ji aliyê roava jî Rûmelî bicarek leyandibû, çend kîlometre hatlbûn nêzîkî Istanbûlê, Lê, Ingilîz zo. hatin gaziya Tirkan. Ingilîzan dil ne kir ku Ilris Istanbûlê 0. geliyên Dardanêlan <Çanakale 0. Bosfor)
bistînin.
Ilrtsan bivê nevê ji vekirandina Istanbûlê berda, ji erdê Osmaniyan gelek cî ji wan ra vegerandin.
Me li jor gotlbû ku Imparatoriya Osmaniyan mezinatî û xurtiya xwe wenda kiribûn. Belê, Imparatoriya Osmaniyan di wan hengaman da ji tabûtuwan û pertewa xwe bêpar 0. cuda mabû. Ev xwehermenda fêris, wek reşê şevê, navekî mezin 0. warekî wenda mabû.
X wehermenda Osmaniyan, bi saya qayîşkêş iya xwehermendên gewre pêdar dima. Roja ku ev qayîşkêşî ji meydanê rabe, ev xwehermend 0. ev gel dê biherife 0. ji meydanê wenda bibe.
SULTAN HAMID
Sultan Hamîd di sala 1903 P.Z. da bi Yewnanistana biçûçik ra şer kir, ew şikand 0. navê "Gazî" bir. Lê, ev ûda firazbaz ji Sultanê fêris ra tu pertew û helahela pir ne kir.
- 222 -
Sultan Hamîd bi van Gewremerd û Paşayên ku ji birayê wî Sultan Azîz ra çewtejotî (sûîqasd) kiribûn baweriya xwe ne dianî. Sultan Hamîd li dora xwe, ji peyayên çê û jêhatî bêtir, hulûlkên (bende) durû û bawervaj dabûn hev.
Sultan Hamîd, ji bo ewlemendiya canê xwe, li geliyê Istanbûlê, li kenarê deryayê, li raserê "Bogaz içi", li rastê YIldizê, bi navê "YIldiz" sarayeke bi navûdeng ava kiribû û dora saraya xwe bi bendeke xurt çember kiribû û pêçabû. Sultan Hamîd, Padîşahê pir pertew û tacdarê fêris ji hundirê vê saraya bi bedenan çemberkirî "kişwerê tabidar û gewre" yê Osmaniyan didêra û kokûsaz dikir !
Li derva, li ba A wrupayiyan, tu paye û bergiraniya xwehermenda Osmanî ne mabû. Hundirê kişwerê osmanî jî di tevhev iyê da bû. Jendumendiyeke (hercumerc, tevlihevî> dijwar fermanferma bû. Li Kurdistanê, Mîrên "ji

ber şûr mayî", serek û giregir, nemaza axayên êlên giran ji bendekarên Padîşah ra serfurû ne dikir. Dêrsim her dem û gav ser radikir. Li Sasûn, Hekarî, Şemdînan û li gelek ciyên din ên Kurdistanê çiksmendiya ferweraniyê nema bû.
Li welatê Arnawûdan, li Yemen, Ibn Suûd, Çiyayê Durziyan tu caran geşteceng kêm ne dibûn.
Di vê sedsala ku tê da A wrupayî di riya zanişmendî û hunerweriyê da bi gavên dêwane pêşde diçûn, Imparatoriya Osmanî jî di nezanîna reş û tarîtiyê da wenda bûbû : zanişwerî, bazirganî, çandevanî û pîşevanî di nimûna (şekil) sedsalên kevnare da bûn.
Kes nezane çawa bûbû. Li Istanbûlê çend debistan avakiribûn. Di bajarên din da, nemaza li Kurdistanê, zanişwerî bicarek hîç bû. Çawa ku zanişwerî li Kurdistanê hîç bû, li ba Arnawûd û Ereban jî hîç bû. Anadol û Rûmelî ji van deran hinek çêtir bûn. Sultan Hamîd û giregirên serayê sûd û behreyên xwe di hiştina gel di nezaniyeke kûr û tarî da dîtibûn.
- 223 -
Çar pisporên Sultan Hamîd, çar gewremerdên bergiran ên seraya Yildiz hebûn : Fehîm Paşa, ji bajarê Bursa: Çerkez Muhammed Paşa (nexwenda); Muhammed Izzet Paşa (Izzet Holo) , ji Şamê; Şêx Ebûl Huda (Ilfurukçu Ebûl Huda) , ji bajarê Helebê.
Fehîm Paşa di pêşiya gişan da bû. Serekê sazmendiya "Jurna1ci"yan bû, agahdarê razên (esrar) bergiran ên Sultan Hamîd û şîretmendê wî yê rûmetwer bû. Çerkez kaba sakal, Muhammed Paşa, nexwenda bû, lê peyakî girs û çeleng û kêrhatî bû. Karkerê bindest ê Fehîm Paşa bû. Ustubarê bergiran ê Muhammed Paşa bi danîna asayiş û ewletiya paytext bû. Zindan û girtîgeh û dûrangeh di bin fermandariya Muhammed Paşa da bûn. Kaba Sakal Muhammed Paşa destê rast ê Fehîm Paşa bû, berpêşgehê (merd') jurnalciyan bû.
Eger em ji hengama Sultan Hamîd ra hengama Jurnalciyan bibêjin. em tu neweyiyê nabêjin. Her roj, bi riya Fehîm Paşa. hezaran [urrial digihîştin destê Kaba Sakal û wî jî bi werbêja wicdanî werbêj dikir, qenc û neqenc ji hev dikirin û dibijartin : bedbextên aliyê neqenc sezayê xwe didît ! Her

roj, bi sedan xanû manê bêgunehan wenda dibûn. Sultan Hamîd û giregirên sarayê ji bo asûdeya xwe ev çare dîtibûn.
Fehîm Paşa bîrewer û jêhatî bû. Lê, behreya xwe ji behreya gel pêştir digirt. Fehîm Paşa ji Sultan Hamîd ra şeqlevanî dikir û bi milyonan berhev dikirin.
Izzet Paşa Holo bawermentirê peyayên Sultan Hamîd bû. Bicarek Sultan Hamîd pê baweriya xwe anîbû û xwe lê spartibû. Muxabin ! Izzet Paşa merivekî bi fend û fût bû, di zexeliyê da pir dijwar bû. Loma, bi fend û fûtan, bi lîzbazî û zexeliyan di navbera gewremerd û paşan da roleke yeman dilîst û bêrîka xwe dadigirt.
Em werin ser Şêx Ebulhudayê Ufurukçu (pufînok). Sultan Hamîd pir ponjnevaj (wehham) bû. Çiçend

ponjnevaj bû, ewçend jî bawervaj bû, olparêzekî çav kor bû. Ebulhudayê zexel bûnişrewanê (haletî rûhiye) Sultan Hamîd baş nas kiribû. Sultan Hamîd dixiste dabê, dafê, jê paye û zêr dibirin.
Sultan Hamîd bawer dikir ku Ebulhuda Yezdanpaye (welî) ye, li tiştine veşare agah e ! Loma, Sultan Hamîd kisseya xwe ya bergiran bi şîret û şîretmendiya Hezretî Ebulhuda çê dikir.
Sultan Hamîd imparatoriya xwe ya gewre ku ji Yemenê ta Qafqasan, ji Basrayê ta Deryayê Adriyatîk pehn û frereh kiribû, bi vê mejikê (zihniyet) digerand. Lê, çawa ev imparatorî hilnediweşiya ? Çima ku Padîşahên Osmaniyan ji alîkî din jî Xelîfeyên Islamê bûn, li nik muslumanan pir xudan rûmet bûn, Textegehên (meqam) wan bilind û pirfiraz bûn. Eger Sultan Hamîd xwe li vî ciyê bilind û pirfiraz nesiparta, du rojan li ser Textê Osmaniyan ne dima, ne mabû !
Di hengama Sultan Hamîd da, ji her pitike (noqta) bûnişa xwehermenda gewre ya Osmaniyan perîşan û berbad bû : diravkodên (kasa) wan vala bûn, rê û şeqam pirr hindik bûn, pirên derbasokan pejmurde bûn, zivistanê rêwîtî heman, heman rawest dibûn. Xweşber, ji kêmaniya riyan bazirganiyeke pêşvebirî û gumreh tunebû : çandevanî ji binî ne mabû. Sazmendiya jandarma pir kêm bû. Jandarma mehaneya (maaş) xwe tekûz ne distend, loma barê ustuyê bêçîz (feqîr> û zebûnan dibûn !

Em werin ordiya Osmaniyan : di hengama Sultan Hamîd da, ordiyeke mordern, bi karûbar, şipîl û bi werziş tu nebû. Kadroyê ordiyê pir kêm bû, serekcengên wan ku berdestên Almanan rabûbûn pir hindik bûn. Di ordiya Osmaniyan da, di hengama Sultan Hamîd da, hêj "blnbaşl û kolagasi'tyên nexwenda hebûn. Ordî gerwerzî (rnanawra) çi ye nizanibû, werziş û perweriş û bendûbesta wê ne baş ba.. Sazmenda tendurustî û barxane di bûnişeke perîşaniyê da bû.

- 225 -

Gelo di pitika tendurustiyê da bûnişa Osmaniyan çawa bû ? Berbadê berbadan bû ! Li bajaran bixwe jimarên bijîjkan pir kêm bûn. Derman û nexweşxane kêm peyda dibûn. Di gundan da bijîjk çi ye kes nizanibû, gundî gerdenxwarê şêx û melan bûn. Şêx û mela ev belengaz bi nivişt û avsûn û pivkirinê bimar (tedawî) dikirin.

Lê berbatt.lrê giştikan bûnişa zan iş we rî bû : jimarên dibistanan li bajaran bixwe gelek hindik bûn. Medreseyên kevnare cîgehên suxte yên nezan bûn. 90% ji gel ne xwenda bûn û 10% mayîn jî xwenda bûn, lê pirtirên van xwendayan jî bawervaj bûn.

Di hengama Sultan Hamîd da, têkilbûna xwehermendên biyaniyan hebû. Bi texlîtan behreyên xwehermendên mezin di erdên Osmaniyan da heban. Loma, wan jî li hundirê kiş werê Osmaniyan rengareng serê şanî û entrîka çêdikirin 0. ji vê yekê di welatê Osmaniyan da tucar tevhevî 0. serkeşî kêm ne dibûn, tukes jîneke asûde derbas ne dikir. Di sedsalên 19im 0. 20im da tevgera xwehermenda Osmanî ewha bû. Belê, rastî eve. Di van sedsalan da Imparatoriya Osmanî evçend pejmurde, ev çend bê tabûtuwan ba !

Gelo çima Imparatoriyek ev çend perîşan, perkende û qels ne dlherifî û ne diçû ? Bi mejîka me, ji bo nemirina vî nexweşê li ber xirexlrê du engîz hebûn: yek jê hundurî, ya din jî derveyî ba.

Engîza hundirî bi yekdemî Xelîfebûna Padîşahê Osmaniyan ba. Engîza derveyî jî qayîşkêşiya Xwehermendên Awrupayiyan ba. Ras ti rê wî behreya ûris û Îngilîz ba.

Em van her du engîzan hinekî kar bikin : 1- Engîza hundirî :

Ji destpêka Islamiyetê, textgeh û Meqamê Xelîfetiyê li ba Islaman bi konevanî û olî ciyekî plrfiraz û bergiran bû. Berê Ereban ji Xelîfe ra "Emîr El-Mumi-
- 226 -
nîn" digot. Paşê Osmaniyan "Halifeyi Ruhi Zemin" digot.
Osmaniyan bi ser mezinayî 0 firazbaziya Xelîfeyên xwe ra xudayî 0 raz berî (manewî), xurtî 0 pertav jî dikir. Osmaniyan di xelîfeyên xwe, raserên nîgerandina enzan, da hebûneke pertewdarî, bahadirî 0 zorawerî didît. Di nivîswaran da, di devê kesan da, li ser xelîfeyan hezar 0 yek çîrok, çîrçîrok, efesane 0 gotinên bêteşe hene : her Xelîfe xudanê çîkmendî (nufûz) 0 pertava 7 yezdanpaye (welî) ye ! Xelîfe li ruyê Deryayê digere, sola wî şil nabe ! Xelîfe şêran 0 dêwan digrin! Xelîfe bi pifkirinê 40 "gawur" dikujin! ...
Textgehê Xelîfetiya pirfiraz zaf bilind bû, pirfiraz û berguzîde (mubarek) bû ! Xelîfeyên mihrivan ji her kêmanî dûr bûn, ji her gunehî pak bûn, pir paqij 0 yekta bûn !
Xe life parêzmendên Islamê yên li ser ruyê zemîn bûn ! Bav 0 Xudanên gel bûn ! Xelîfe ji her du çavên gel mihrivantir bûn ! Gel hemî bende 0 hulûlk 0 goriyên naçîz ên Xelîfeyên xwe bûn ! ...
Şoreşên serxwebûnê yên Kurdan, serkeşiyên Yemeniyan, rabûna Arnawûdan ... ji çi engîzî, lezûbez 0 bi hêsanî dihatin vemirandin? Çima ku mêrê musluman zû bi zû bi leşkerê Xelîfe ra şer ne dikir. Cengkirin di nuxûna Xelîfan da gunehkariyeke mezin bû ! kufurbazî bû !
Çawa dibe ! Mîrên Kurdan maf 0 serxwebûnê dixwazin ? Ma imamên Yemenê ji Xwedê natirsin, pey azadî 0 mafê xwe digerin ? Begên Arnawûdan çi dikin ? Çima hildikişin çiyê, li rizgariya xwe digerin ? Tevgerên wusa ne bi cî ne, bêolî ne ! Ciyê kirdaran doje ye ! Çareya yegane ya rizgariyê serfirûbûna Xelîfe ye.
Li her goşeyên Imparatoriya Osmaniyan zanayên Olê, şêx 0 mela 0 şorindgo (waiz) giş bi yek dev û yek deng, ji sedsalan ve, ji gelê osmanî ra
-
- 227 -

Ereb, Kurd, Tirk, Çerkez, Laz, Arnawûd, Boşnak, Pomak ... - ev rewan û mejîkên serfirû û tekapê (secde) kirin, ji Xelîfeyan ra şev û roj xwend û pif kir.
Gelên nezan û dil paqij bi sedsalan ev deng û gotin û peyv godarî dikirin. Ev pesn û aferînxaniyên Xelîfeyan di mejî û hestiyên gelê nezan da bi cî bû û tê da çikiya !
Osmaniyên Musulman giş - Ereb jî tevî wan - wuha bawer dikir : qelsiya Xwehermenda Osmanî qelsiya Islamê ye. Islam bi hebûna Padîşah û Xelîfeyên Osmaniyan paydar e. Ev bawerî û ev ewlemendî qenc ketibû ser û mejiyê vî gelê olparêz û bawerhişk. Loma, Musulmanên Osmaniyan ji her renc û êşê ra : birçîbûn, tazîbûn, kêmasî û belengazî qîma xwe anî bûn. Wan sond xwaribû û peyman kiribû ku ta mirinê ew dê li ber xwe bidin û ji bin fermana Xelîfe dernakevin !
Ev bawermendiya Musulmanên Osmaniyan, Sultan Hamîd û Sultanên din, ta Mustafa Kemal û Ismet û Celal Bayar ... û yên din jî heya îro paydar hiştiye.
Belê, engîza ne hilweşîn û neherifîna Xwehermendên Osmaniyan ên Tirkan ev bawermendiya tebût e.
Ev e ku di sedsalên 19im û 20im ên Islamiyetiyê da xwehermenda Osmaniyan, û vê paşiyê jî Cumhûriyeta Tirkan, ji hilweşînê reha kir. Hemş (hetta) flrazbazî û pertewdariya Yawuz Sultan Selîm û çend Padîşahên peyhatiyên wî jî sîdariyê bihevgihîştina Xilafetî û Padîşahî bû.
Belê, Ola Islamê ji Xwehermenda Osmaniyan ra, paşê jî ji Tirkan ra, qenckariyên mezin kirin. Lê, Kurd û gelên din ên Musulman jî ji Osmaniyan û Tirkan ra kirin bende û hulûlk.
Nemaza serek û şêx û melleyên nezan ên behreger (menfeetperest) ên Kurd bi salan li nalandina Kurdan, li bin bindestî û girtîtiyên Tirkan, guh ne

1. Gava di nav 400 salan da Kurd ji behadirên kurên xwe bi milyonan xort, ji bo maf û serxwebûna xwe, kirin gorî, gelek ji Mîrên Kurd bûn hevalbendên Xe lîfe û Tirkan !

Mustafa Kemal bixwe jî di 1919 da, di şerê Yewnaniyan da, li Erzeromê ji bo xapandina Kurdan teylesana şêxan da serê xwe û cubbeya muft.iyan jî li xwe pêça û bû hevalê şêx û melan û muft.iyan: bi ayetan, bi hedîsan Kurd xapandin. Kurdan alîkariya Mustafa Kemal kir, Yewnanî şikandin û şer kar kir. Mustafa Kemal bû "Gazi Paşa", bû AtatUrk, bû Serekê Cumhur ! Lê Mustafa Kemal bêbext derket, tu maf û azadî ne da Kurdan, sond û peymana xwe ji bîr kir.

Kurdan di 1925 P.Z. da şoreş rakir. Ji Şêx Seîd, Şêx Şerîf, Şêx Şemseddîn û çend hevalên wan pêva, bi hezaran şêx û melle bûn hevalên Mustafa Kemal û alîkariya birayên xwe yên xwînê ne kir, bi rovajî alîkariya Mustafa Kemalê xwînvexwarê Kurdan kir!

Van nezanan, bêbext û behregeran (menfeetperest}, van şêx û melan, axa û began, li kuştina birayên xwe - bi rengareng êş û işkence - temaşa kir.

Evçend mirarkerî ji bo rûmet û evîna şaşik, cubbe, teylesan, ayet û hedîsan, û ji bo Xelîfeyan çê bû !

2- Engîza derveyî :

Di sedsala 19im û di nîvê sedsala 20im da, ûris û Îngilîz ji bo Istanbûlê û her du geliyên wê <Bos for û Dardanêl) qayîşkêşî dikir. Istanbûl û her du geliyên wê ji van her du xwehermendên mezin ra pir diva bû. Bosfor û Dardanê l ji aliyên Ceng û Bazirganî, ji aliyên konevaniya Balkan û Rohilata Navîn, ji her du xwehermendan ra ciyên pir bergiran bûn. Loma, her du xwehermendên emperyalîst ji bo Istanbûl û her du geliyên wê li hev ne dikir. Wek çareya yegane, Padîşahên Osmaniyan li van ciyan pasivan dihiştin !

- 229 -

Qayîşkêşiya her du emperyalîstan dibû engîza payedariya xwehermenda Osmaniyan. Di sala 1873 P.Z. da ûris di nixûna Osmaniyan da bangşer (Îlanî Herb) kir. Di demeke hindik da, ji rohilat gihîşt Erzeromê; ji aliyê roava Rûmelî giş leyand û bi çend kîlometre nêzîkê Istanbûlê hat. Lê, Geştecengên Ingilîzan ji Dardanêl derbas bûn, li pêşberê Ayastafanosê lenger avêtin. ûrisan bivê nevê paş ustuyên xwe xurandin. Istanbûla rengîn careke din ji Tirkan ra hişt û çûn.

Di 1914 P.Z. da, di şerê yekemîn ê cihanî da, gava Alman û yekdestê wî yê Osmanî li ber Ingilîz û hevalên wî şikiyan, Amerîka, Ingilîz, Fransiz û hevalên wan di 1918 P.Z. da ketin Istanbûlê û gelek ciyên Anadolê jî leyandin. Çar sal Istanbûl di bin destê wan da ma. Çar sal fermandarê Istanbûlê serleşkerekî (Haut commlssatre) Ingilîz bû.
Lê, mana Ingilîzan li Istanbûlê tucar bi qîma ûrisan ne dihat. ûris alîkariya Mustafa Kemal kir. Alîkariya han ev kisseyê bicarek guhart. Ingilîz û hevalên wî paş çar salan - sala 1922 - Istanbûl vala kir û korûpoşman Istanbûl hişt û çûn !
Hazretê Mustafa Kemal Paşa bi saya ûrisan Istanbûl û Anadol ji nû da xistin bin destê xwe û hat li seraya "Dolma Bahçe" pal da !
X wehermenda Osmanî ku di sala 1918 da bicarek hilweşiyabû bi xweşxwaziya (lutuf) Ûrisên Bolşevîk navê xwe guhart, bû "Cumhûriyeta Tirkiye" û ji mirinê reha bû.
Ji nû da Mustafa Kemal û Cumhûriyeta wî li serê Kurdan bûn bobelateke mezin.
- 230 -
ARMENY A LI ASYAYA BIÇOK
Ermenî ku 2500 sal hevsiyên Kurdan in, em dixwazin ji wan hinek zanegî bidin û di van 2500 salan da têkiliyên her du gelên hevsî çawa ban hindik ek karûwer bibin (34).
Nejadê Ermeniyan jî wek Kurdan Endo- Awrupayî ye. Ermenî deh hezar sal berî zayîna Isa, di koçbariya giştî da - wek "Arî"yên din - ji Iskandinavya bi koçbarî ber bi nîvro koç kirine.
Lê, Ermenî, berê, di vê koçbariyê da, wek Kurdan ne li Qefqasan û Araratan ban. Ermenî ji aliyê Romanyayê derbas ban û berê xwe da Yewnanistanê û li Trakyayê bi cî ban (35).
Ermenî ji ber Sîtan baz da, xwe li Kurdan (li Araratan) girt. Kurdan ev Ermeniyên penahvêj (multecî) bi dilovanî pezirandin, ji van penahvêjan ra dilxweşî kir, dostanî û biratî nîşan dan.
Di van hengaman da navê Padîşahiya Kurdan a Araratan Xaltî ba. Ev padîşahiya Xaltiyan Padîşahiyeke xurt ba, ji aliyê roava digihîşt Torosan. Paytextê Xaltiyan Tospa (Wan) ba.

Kurdên Xaltî ji Ermeniyên Penahvêj ra mêvanperwerîyeke mezin kir. Ermenî ji van qencî û mihrivaniyên Kurdan pir dilşa ban. Dostaniyeke hêja di navbera Kurd û Ermeniyan da çê ba. Ev dostanî û niwazişên Kurdan ewçend çû ku Ermenî Xudayê Xaltiyan ku navê wî "HAY" ba ji xwe ra kir "Parastek" (rnabûd). Hay, ano Zaniş, Hiş, Bîrewerî. Û Ermeniyan navê xwe jî kir "HA YIK" .

- 231 -

Ji van berjendinan (îzah) tê fehm kirin ku Ermenî piştxwaz (mahmî) bûn û Kurd jî piştedar (hamî) bûn. Ermeniyên piştxwaz ola piştedarên xwe pezirand û navê xwe jî kir HA ytK.

Baş xuya dibe ku Ermenî bi zora şûrê xwe ne hatibûn Araratan û bi şer û ceng û bi xurtî jî li Araratan bi cî ne bûbûn. Bi berevaj, ev Ermenî ji ber stemên Sîtan reviyabûn, revokeyên belengaz bûn.

Ji aşkartina {isbat} van engeştan (iddia), em nivîsandinên jêrîn pêş we dikin.

Di nivîs warên dîrokan da nivîsandine ku ber bi sedsala 6im B.Z., Ermeniyan ber bi Araratan koç kir. Cardin van nivîs warên dîrokan nivîsand ku Padîşahê Kurdan, Key Aksarê Kişwergîr, di sala 625 B.Z. da li Text rûniştibû û di 623 B.Z. da Nînwa, Paytextê Asoran, dorpêç kiribû. Di hengama dorpêçkirinê da, Sît ji bakurr hatin, Kurdistan, Gurcistann, Armenya, Pont û Kapadokya dan ber xwe.

Key Aksar li ber metirsa Sîtan dev ji dorpêça Nînwa berda. Ji bo derxistina Sîtan ji Kurdistana bakurr bi salan bi Sîtan ra koşiya. Di sala 615 da Sît ji Kurdistanê qewirandin, paşê ket pey Sîtan, ew ji Armenya, Kapadokya û Pont deranîn. Ev her sê kişwer veserê mawe) Kurdistanê kirin. Bi vî awayî sînorên Kurdistanê gihandin Çemê Halis (QIZtl Irmak). Key Aksar di sala 612 B.Z. da Nînwa vekirand. Xwehermenda Asor ji ruyê cihanê rakir. Ev vêrastên dîrokê di nivîs waran da nivîsandîne.

Ordiya Key Aksar di 615 B.Z. da Armenya, Pont û Kapadokya heya Deryayê Reş vekirandin û ev her sê kişwer jî bi ser Kurdistanê va veser kirin. Ev bûniş heya hatina Iskenderê Mezin 300 sal ajot. Wuha ye, Ermenî 300 sal berbendên (tebaa) Kurdan bûn.

- 232 -

Gava ev vêrastên dîrokê li meydanê bin, gelo meriv dikare bibêje ku Ermenî di 600 sal B.Z. da dirêjî Araratan kir û Xaltî şikandin, Ararat ji destê Kurdan stendin ? Gelo engaştinên <iddia) ewha dikevin serê kê ? Ma dîrok hiş û hoşmêja (mantiq) tiştine ewha dipezirîne ?
Kurdên ku 2000 sal bê aram cengên Asoran kirin, 2000 sal sîngên xwe li ber ordiya Asorê zorba kirin mertal 0 dawiya dawîn Nînwa vekirand û Asor kirin tunne, ma ev Kurdên bahadir li ber çar Ermenî şikiyan ?
Di van hengaman da - 600 B.Z. - Ermenî ji Trakya hêj nû hatlbûn. di nîştimanê xwe yê nû da - dora Rewanê "Wan" - hêj nû bi cî bûbûn, dema ku rastî hengemeyê Sîtan perîşan bûn, ji hev ketin.
Paşê, Key Aksar, Padîşahê Kurdan, hat gaziyê, Sît ji Kurdistana bakurr, ji Armenya, ji Pont û ji Kapadokya qewirandin, ev kişwer ji Sîtan paqij kirin; her sê padîşahî jî, ferweriya Ermeniyan jî ne man, ordiya Ermeniyan jî ne ma !
Rastî eve: hinek Ermenî, ji bo rehakirina canê xwe yê şêrîn, ji ber Sîtan reviyabûn, xwe avêtibûn bextê Kurdan. Kurdan ev penahxwaz pezirandibûn, paşê van Ermeniyên penahvêj Xudayê Kurdan ku navê wî HAY bû ji xwe ra kir parastek 0 navê xwe jî kir HA YÎK.
Eger em van nivîsandinên han kurtebir bikin, Ermeniyan di sala 600 B.Z. da ji Trakya hatin Asyaya Biçûk. Di vê navê da, Key Aksar Nînwa vekirand, Sît ji Asyaya Biçûk qewirandin, Armenya, Pont 0 Kapadokya bi welatê xwe va girê da. Ta wendabûna Şahinşahiya Kurdistanê bi destê Iskenderê Mezin, Ermenî 300 sal bûn berbendên Xwehermenda Keyaniyan, ano berbendên Şahînşahiya Kurdan.
- 233 -
LI DORA ARARA TAN
ROŞMANA {W AZIYET> KURD Û ERMEN
Em dê roşmana Kurd 0 Ermeniyan li dora Araratan, ji hengama Koçbariya gişkî ta vesendina Kurdistanê bi destê Iskenderê Mezin, ano ta sala 331 B.Z., ji nû va berçav bikin :
Kurd 10.000 sal B.Z. ji Iskandinavya koçbar kirine, berê xwe dane nîvro, li Qefqasan 0 li Araratan bi cî bûne. Û 6.000 sal B.Z., dibe ku hîn bêtir, gihîştine van doran. Kurdên ku di van deman da hatin Araratan du ezbet

bûn : KOtî 0 Kurtî. Kurtî ji KOtiyan cuda bûn, çûn ber bi Deryayê Kaspînê. Kurt.iyan, li Asyaya roava, ji rohilata Araratan ta bajarê Belxê vesend. Ji aliyê nîvro jî gihîştin Deryayê Umanê.
KOtî jî Araratan, Zagrosan 0 kenarên Çemê Diclê girtin. Paşê, bi sedsalan bela bûn, pehn bûn, erdê xwe fereh kir: Antîtorosan, Torosan 0 paşê SOrya jî vesend, gihîşt sînorên Firewnan.
Di van hengaman da, di van hengamên pêşveçûna Kurdan da - 6000-4000 sal B.Z. - pehnavên (wadî) Dicle 0 Firat di destê sê hawişan da bûn : Sûmîr, Akad 0 Elam. Kurdên KOtî bi van her sê hawişan ra bi sedsalan 0 hezarsalan şer kir. Dawiya dawîn her sê hawiş jî şikandin 0 wenda kirin 0 Kurd di her sê kişweran da Fermanferma bOn.
Di hengama çêbûna van gertevan da, li ser ruyê cihanê navên Klldan, Asor, Paris 0 Ecem hêj ne dihatin bihîstin. Eger navê Ermen dihat bihîstin, ne li Araratan 0 li serekaniyên Dicle 0 Firat dihat bihîstin, belkî li rohilatê Makêdonya, li Trakyayê dihat bihîstin.
Belê, Ermeniyan di dawiya sedsala 7im B.Z. da Trakya berda, derbasî Asyaya Biçûk bûn 0 di sala 600 B.Z. da li dora Rewanê rûnişt.in, Wuha ye; li van doran dengên Ermeniyan ji dengên Kurdan 5.500 sal bi şûnda, ano 55 sedsal bi şûnda, hat bihîstin.
- 234 -
ERMENI BÛN BERBENDI::N KURDAN
Ermeniyan di dawiya sedsala 7im da ji Awrûpa koç kir, hatin Asyayê, li dora Rewanê bi cî bûn. Di van salan bixwe da, Key Aksar, Padîşahê Kurdan, Nînwa vekirand, Sît ji Asyayê qewirandin, Armenya, Pont û Kapadokya vesendin. Ev her sê Padîşahî jî bûn sê Satrapên Kurdistanê û gelên her sê Satrapan jî bûn berbendên Kurdistanê. Ermenî ji 615 B.Z. ta 331 B.Z. bûn berbendên Kurdan. Paşê, di sala 331 B.Z. da, Iskenderê Mezin hat, Kurdistan seraser - ji Deryayê Sipî ta bajarê Belxê û sînorê Hindistanê - leyand û vekirand. Iskender zû mir (356-323). Di dewsa wî da generalê wî Sêlêkos di 312 B.Z. da bû Padîşahê Kurdistanê. Armenya bû Satrapeke Selefklyan. Ermenî 109 sal bûn berbendên Selefkiyan. Padişahîya Sêlêkos pir ne ajot. Di sala 125 B.Z. da, Key Kubbadê Kurd "Arşek" rabû, padîşahiya Aşkaniyan a Kurd serrast kir, Padîşahiya Sêlêkos

wenda kir. Armenya ji nû da bû Satrapeke Kurdistanê. Ermenî îcar jî 480 sal bindestên Aşkaniyan man. Paşê, di sala 26 P.Z. da, Erdişîrê Babekî yê Kurd Padîşahiya Aşkaniyan wergerand û Padîşahiya Sasaniyan sazdar kir. Îcar jî Armenya bû Satrapeke Sasaniyan.
Lê, Roma li dawiya hengama Aşkaniyan dest bi vekirandina Asya kiribû. Ji bo vê yekê, Gurcistan, Armenya, Pont û Kurdistana roava di navbera Roma û Aşkaniyan da - vê paşiyê Sasaniyan da - meydana şer û koşandinê bû. Ev kişwerên bedbext bûn bazîçe û goriyên van emperyalîstan û 600 sal aşîtî û aram ne dîtin.
Gava di sedsala 7im P.Z. da vekirandina Islamê dest pê kir, Kurd jî, Ermenî jî, Paris jî bûn dîlên bindest ên emperyalîzma Ereban. Di 1278 P.Z. da, neviyê Cengîz Xan, Hulaku, Bexda vekirand, Xelîfe kuşt. tûdeyê Bexdê ji şûr derbas kir, 800.000 enzan bilêc kirin. Ji vê demê bi şûnda, leyandina Tatar, Tirk û Tirkmenan dest pê kir ...
Ev nivîsandina me eşkere nîşan dide ku Ermenî

tucar ferwerê Kurdistanê 0 çiyayên Kurdistanê, çiyayên Araratan, ên Erzerom, Erzincan, Dêrsim 0 zozanên wan 0 çiyayên din ne bûne (36) •••
KURD Û ERMENÎ DI HENGAMA FEŞARTINA ONTIŞAR) ISLAMÊ DA EMPERY ALÎSTÊN TIRK Û EREBÊN ÎRO
Islamîtî di destpêka feşartina xwe da ji Ermeniyan ra - çima ku Mesîhî bûn - firawaniyeke mezin bû: ji Kurdan ra jî ji qotik 0 jan dijwartir mîratkeriyek bO.
Di destpêka Islametiyê da, Ereb ji Mesîhiyan ra Xudan Nivîswar got 0 Mesîhî jî di aşîtî 0 asayişê da jîn. Loma, Ermeniyan ji Musulmanan tu ziyan ne dît.
Kurd Zerdeştî bûn. Nivîswara wan "Awîsta" bû. Erban A wîsta wek Incîl nivîs wara Asmanî ne pezirand. Ji bo vê yekê, Ereban ji Kurdan ra Gawur got 0 ji wan ra bi awakî dijwar 0 şermsarî stemkarî kir. Xweşber, Kurd jî bi Ereban ra şerine dijwar kirin. Di destpêkê da, Ereb şikiyan 0 serfermandarên wan hatin kuştin. Ereb reviyan, lê paşê cardin vegeriyan. Îcar Kurd şikiyan 0 bi şkestineke dijwar ji hev belav bûn. Ereban wicdan bicarek ji bîr kir, bajar, gund, deşt 0 çiya talan kirin, wêran kirin, agir berda

wan. Deverên ku ordiyên Ereban karibûn bikevinê tu avayî ne hişt. Bi salan ev bêdadiyên Ereban dirêj kirin : bilêckirin, şewitandin, talankirin, namûsa pakdawan jî lekedar 0 paymalkirin (37).
Weke ku me li jor gotibû, Islamîtî di destpêkê da Kurd nabedîd kirin 0 şewitandin. Lê Ermenî ne êşandin. Ermenî gihîştin aşîtî 0 asûdegiyê : welatê wan ji ordiyên Sasaniyan 0 Roma ra 600 sal bûbû meydana ceng 0 pevçûnê. Êdî tu şer 0 ceng ne mabû, dawiya pevçûn 0 lihevxistinê hat. Li ba Ereban, Ermenî Xudan Nivîs war bûn, loma tu

kuştin û talan ne dîtin, gihîştin jîneke asûde û ewlemend : zimanê wan, ola wan, hencarên (adet) wan bi rehayî ji wan ra man. Lê Kurd Zerdeştî ban. Loma Ereban ji wan ra aşîtî mefer ne da. Kurd ji bo parastin û qedxenkirina zimanê xwe, ola xwe, gerdişa xwe, namûs û hebana xwe tu çareke din ne dît û rahişt gurz, şar û xenceran!
Kurdan bi Ereban ra bi rojan, bi mehan û bi salan ceng û şer kir; pir kuşt û pir xwe da kuştin, wek çem û leyiyan xwîna sor lîzikandin. Lê, dawiya Ereban ne hat û ew xwediyên du çekan ban ! Wan bi destekî şar digirt û bi yê din jî Quran. Ereban ne bi mêrxasî, lê bi firîb û dekan zora Kurdan bir! Q Kurdê pehlewan, Kurdê cihangîr şikiya. Kurd ne ji şlvik û darikan ban ! Kurd ji pola û mifriq ban ! Kurd wek şlvikan du ta ne ban, wek pola şikiyan !
Kurdên ku bi dilîrî û xurtî pêdarî kir tev de hatin kuştin. Kurdan kurên xwe yên berjiste wenda kirin. Kurdên kêrnehatî yên şûndamayî musulmanî pezirand û canê xwe yê şêrîn reha kir. Lê, namûs û rûmeta xwe reha ne kirin. Kurdên ku Musulmanî jî pezirandiba cardin ji st.ernkerî-û bêrûmetiyê reha ne baban. Cara yekim axaftina kurdî ji binî nadar (rnemnû) ba. Kurdên musulmanbûyî jî eger zimanê xwe biaxiftana bê mihribanî, bê dudilî zimanên wan bi cawbirran (*) diçirpandin.
Ev bêdadkeriya Ereban 110 sal dirêj kir.
DI ZANIŞ Q ZANIŞWERIY~ DA ENGYZA
BERTERIY A (F AIQIYET) ERMENIYAN JI KURDAN
Padîşahê Osmaniyan, Sultan Muhammedê kişwergîr, gava Istanbûl vekirand, ji Ermeniyan ra (û ji Ilrlman û hawişên din ên ne musulman ra

jî) bi fermanên gewre servedarî (îmtiyaz) dan. Bi maf û toreyên (selahiyyet) van fermanan, Patrîkxaneyên Ermeniyan wek bi nîvserxwebûnî li Istanbûlê sazmaniya ferwerlyekê danî. Bi vî awayî, Ermeniyan du Dîwan (Heyet)
- 237 -
rast kirin : rewanî (rûhanî) û peykerî (cismanî). Bi bijartina tade, komel û encumenên wan çê ban, Ermenî ban xudan diravkod (kasa) û kodikên alîkariyê.
Ev sazmendiyên han ne bitenê li Istanbûlê, li her aliyê kiş werê Osmaniyan, li her bajarî sazmendiyên ew ha serrast klrlbûn. Ev baxşîşên Padîşahên Osmaniyan ji Ermeniyan ra ban firawaniyeke Yezdanî.
Jixwe, Gutenbergê Alman di sala 1436 da çapsazî ji na da anîba meydanê. Di van deman da enzanîtî di nav nezanîtiyeke reş û tarî da wenda baba û jimarên merivên xwenda pir kêm ban. Xweşber, Ermenî jî di vê bûnişê da ban. Paş 200 salan, gava çapsazî ji Awrupayê xwe gihande Istanbûlê, Ermeniyên rahijmend (muteşebbis) berî hawişan giş rahişt wê kisseyê. Ermeniyên xebatkar û karaşîna di demeke hindik da çapsaziya Istanbûlê xist bin dest xwe. Ermenî, ji vê engrze , ji alîkî ban xudan saman (serwet), ji aliyê din jî xwe gihand xwendevaniyeke zor.
Ermenî, bi bexşandina servedariyên Sultan Muhammed û bi xebata çapsaziyê, di demeke hindik da xwendevaniya xwe pir pêşve bir.
Dîwana peykerî (meclisê cismanî) ya Patrîkxaneya Ermeniyan ji bo pêşvebirina xwendevaniyê pir koşiya. Her sal jimarên debistanan pirtir diban. Di van 40-50 salan da, jimarên Ermeniyan gihîştin bişkavtineke mezin. Zimanekî wîjeyî (edebî) yê ermenî çê ba, derket meydanê. Paşê, li Istanbûlê, jimarên rojnave û kovaran ji berê va pir ban. Nlvîswarên zanişmendî, romanên wîjeyî bi fira wanî çap diban û bela diban. Xweşber, nivîswarên debistanî pelika yekim a bernaveya xebatê ba. Di kişwerê Osmaniyan da, sal bi sal jimarên debistanan bêtir diban. Ermenî, ku li riya zanişmendî û hunerweriyê evçend pêşve çûn, xweşber li jîna kardes tî (pratîk) jî kamwerlyên mezin birin serî, di bazirganî û pîşewerî (senet) da ciyên bilind girtin.
- 238 -

Lê, gava Ermenî di vê pêşveçûn û tuwangerî û gumrehiyê da dijiyan, gelo Kurdên bedbext di çi bûnişê da bûn ?
Kurdistan bi leyandina Ereban kete çi bûnişê, me bertir nivîsiye. Di destpêka leyandina Ereban da pir ciyên Kurdistanê bûn wêranezar. Nîvê gelê Kurdistanê xwe kire goriyê nîştimanê xwe, azadî û ola xwe ! Kêrnehatiyên din bûn musulman û canê xwe reha kir. Lê Kurdistan bi zor 150 sal, û di hin ciyan da 300 sal, bi şûnda gihîşt aşîtî û aramê.
Bi sazmendiya Xelîfetiya Abbasiyan li Bexdê, Kurd gihîştin aram û asûdegî. Nemaza birrên tovrindan û şerkerên şerevanan bûn xudan payeyên bilind 0. bercuste. Kurd gihîştin her payeyên bilind : Mîr, Mîrê Mîran, Xan, Padîşah 0. Şah 0. Şahînşah, Lê, piraniya gelê kurd di bûnişa xwe da hatin hiştin - hêj rasttir di bûnişa xwe da ne hatin hiştin -. Belkî tûdeyê Kurd di devê guran da hat hiştin. Vî tûdeyê belengaz spartin bindestê şêx û melan, melleyên tarînezan û behreger. Kurdê belengaz li bin destê van şêx û mel leyên cihannedîtî, nezan û behreger ev tiştên han kar kirin : nezanî, hişkbaweriya vala, olparêziya çav kor, ji Xelîfeyan û Padîşahan ra serflrûbûn, ji bo nav û rûmeta Xelîfeyan û Padîşahan ceng û pevçûn û di meydana şerran da karkirina "Rutbeyî Şehadet" !!
Ev bûnişên Kurdan ku me jimartin, heya îro ne guherîne ! Nemaza bêparbûna Kurdan ji xwendin 0. zanişmendî 0. huneriyê !
Li îran, Tirkiye, Iraq 0. Sûriyê yek debistana Kurdan tune. Di van kişweran da xwendin û nivîsandina kurdî - yekcaran jî peyva kurdî - sûcekî mezin e ! mirarkerî ye !
Pir muxabin, di van demên nêzîk da, Ingilîz li Iraqê û Fransiz li Sûriyê bi salan ferweranî kir : lê zanişweriya Kurdan yek pê pêşve ne ço. û tevnegeriya. Nemaza li Sûriyê bi hezaran debistanên vîjeyên her

hawişî hene : Ereb. Suryanî, Asorî, Kildanî, Ermenî û Cuhû. Lê Kurd ji vî mafî, ji vê firavaniyê bêpar in ! Kurd bibe xwediyê debistan ? Kurd zimanê xwe bixwîne ? Ev tiştê han gunehkariyeke mezin e! Divê Kurd nexwîne, Kurd nexwenda û nezan bimîne!
Kurdên belengaz ên Sûriyê, ji bo dermankirina derdê xwe yê giran û bê derman, encumen çê kirin, giregirên xwe dan pêşiya xwe û pir caran

diçûn Bêrûdê, giliyên xwe pêş "Haut Commlssariat" dikirin. Lê "Haut Commissaire"ê fransiz Kurdên ustûxwar bi peyv û gotinan dixapandin! Pir muxabin, Ferwerana Franstz ustubara (wezîfe) xwe ya konevanî, şehrevanî û zanewerî bi cî ne dianî. Ferweranê gewre yê Fransiz 2S sal Kurdên reben xapandin û ne hişt ku Kurd bibe xwediyê yek debistana "Y ekimî",

Hezar û sê sed sal e ku ev bûnişa girînxwîn a Kurdan dirêj dike û diçe ! Xelîfeyên Musulman berî 1300 sal çi kir ji Kurdan ra, çawa Kurd bê ziman û bê xwendin hiştin, Şah û Padîşah û Serektûdeyên wan jî û "Haut Commissaire" ên Ingilîz û Fransiz jî wek wan kir, Kurd nezan û nexwenda hiştin. Û îro jî şopa berê dajon; îro jî ji vê şopa neenzanî Û stemkerî venegeriyane !

Kurd di navbera sê xwehermendên musulman da hatine parkirin : Tirk, Ecem Û Ereb. Ev her sê xwehermendên musulman goya pariyeke pir hêsan e - dixwazin Kurdan daqurtînin.

Ev her sê xwehermendên musulman, ji bo ku bigihîjin dil xwaza xwe ya xam, ji sedsalan ve ji rengareng zuşt kerî, mlrarkerî û nebekariyên xwe venagerin. Ev her sê xwehermend - Tirk, Ecem, Ereb -, weke ku bi hevre şîretkerî kirine û yekgotin bûne, li ser sistemekê, bernavekê, mezintirê bêdadkerî ji bo Kurdan çê dikin. Belê, hovnaktirê bêdadkerî ji bilêc û talan û şewat û zindan û dûrandin dijwartir û wêrankertir rencek heye, bi vê renca yeman Kurdan dikujin !

- 240-

Ev her sê xwehermendên musulman gelo bi çi rencî Kurdan dikujin ? Gelo ev rencê rencan çi ye? Çi teba ye ? Ji hilêc, ji agir. ji talan xurtir çi renc ji van renctir. çi bobelat heye ? Kurd nezan hiştin! Ji Kurdan ra mafê xwendinê ne dan !

Ev konevaniya mirarkerî di hengama xelîfeyê duyim ê musulman Omer Ibn Xettab da dest pê kir. Hêj wê gavê Kurd zimanê xwe bipeylviyana, bi cawbiran zimanên wan bedbextan diçirpandin ! Her sê xwe hermendên tirk. ecem Q ereb îroj jî şopa Omer dajon. Di nezanhiştina Kurdan. girtin Q hilweşandina debistanan Q di çirandina alfebeyan da çi ji wan dihat dirîx ne dikir Q nakin !

Ji bo mlrdarî Q bêbaviyên din ên sivik. bilêckirin, darvekirin. şewitandin. bidestavêtina dawpaqijan ... di her keysanînê da tu kêmanî nahêlin, hergav diaşkirînin ku şopajoyên Omer Ibn Xettab in !

Kurd ji 60-70 sal vir da çiçend ku zimanê wan karibû bigere Q qelemên wan karibûn binivîsînin, ustuyên xwe yên stemdîtî xwar kirin, bûnişa xwe ya dilxiraş Q purxun ji cihana şehremendiyê ra gilî kir. Lê, hezaran muxabin ! Gazî Q nalînên wan ên cangudaz, nalînên wan ên dilşewat kêm kes guhdarî kir. Nemaza cîgehên konevanî hîç giranberî (ehem-miyet) ne da : ne "Komela Hawişan" a Genev, ne jî "Komela Gelan" a New York ji perîşanî Q stemkêşiya Kurdan ra êşiya !

Li vir ponjek heye. Divê meriv bi giranberî biendîşe, gelo di vî gelî da - gelê Kurd - ev ferûtaba (quwwet Q qudret) veşirî çi ye ? ! Ev ferû tab Q ev jîndarî ku evçend ji berberiyên hovnak ra pêdarî kir Q hê jî dike çi ye ? Ev xurtî Q zora werî çi tişt e ? ! Kurd ev sirişt 0. bunyad çawa peyda kiriye ?

GERDIŞA (WEZIYET> KURD Q ERMENIYAN BI KURTEBIRI

Em gerdişa Kurd 0. Ermeniyan di bin ferweriya van

emperyalistan da çawa bû bi kurtebirî binivîsînin. Ev her du hawîşên hemsî yek jê gihîşt zanişmendî û bîreweriyê, ê din jî di nav nezanî û di hişkbaweriyê da hat hiştin!

Eger em pirsa bilêc û kuştin û talan û koçandinê bikin, her du hawiş jî para xwe bi firehî stend !

Me gava gerdişên Kurd û Ermeniyan diendizandin, em hinek çeperê bûn, me nikaribû xwe bigirin û em rabûn, me derdên kevn û nû yên Kurdan rêtin û jimartin.

Bi rastî di nivîsandina van rêzan da dil xwaza me ya vêrast ne derdrêtin bû. Dilxwaza me ku em bidin zanîn eve: gelo Ermenî ji çi engîzî di riya zanişmendî û bîreweriyê da pêş ve çûn û Kurd çima berovaj xurû û di nezanişa tarî û reş da man?

Dilxwaza me ya din jî ev bû : em bidin zanîn ku çawa Ermenî ji nezaniya Kurdan gend (Ist.ifade) dikin û çawa bi bêbextî û stemkerî kopên dijwar li Kurdan dixin ! Be lê, Ermenî di zanişmendî û bîreweriyê da pir pêşveçûn, Kurd jî pir paş ve man. Ev rastiya han li meydanê ye, nayê veşartin. Lê,

tukes Ermeniyan li tu ciyan ji xwendinê radar (manî) ne kiriye. Lê, Kurd ji vê firawaniyê hergav û li her cî ji binî bêpar mane ! Çawa ku Kurd vê rastiyê dizanin, Ermenî jî di van kissan da li berteriya xwe pir baş agah in. Bi vî awayî, Ermeniyan, ku meydan vala dît, di propagandayên xwe da bi bêwicdanî di nixûna Kurdan da pir tiştên ne rast û kirêt û çepel nivîsandin û hê jî dinivîsînin. Tu caran ji bêbextî û çewt û xwariyên xwe şûnda namînin. Ji bo şerandina {inkar> mafê Kurdistanê, çi ji destê wan bê dirix nakin. Nemaza nivîswarên ku di debistanan da ji zarokên xwe ra didin xwendin çi jahr in ! çi non in !

Di van demên paşiyê da, dîrokvan û coxrafîşînasên Ermeniyan dîroka Kurdistan û herşeya (xarite) Kurdistanê herdem biçûk dikin. Eger ev baron bi vî

awayî bajon, di demeke nêzîk da herşeya Kurdistanê ji ruyê cihanê bicarek ew dê rakin. Xweşber, ji van kamweriyên xwe yên mezin, ji Ecem, Ereb û Tirkan, aferînan û nîşanên zêrîn dê bistînin !

Çêtir ev e ku em kisseya çewtgerandina dîrok û coxrafya Kurdistanê kurt bibirin û çend nimûne nîşan bidin û dawiya vê kisseyê bibînin :

1- Nivîswarên Ermeniyan Nehriyên Sûbarî kirine Ermenî ! Ev engiş ji binî da ne rast e : Nehrî birrekî Sûbarî yê Kurd in. Sûbarî 6.000 sal B.Z. li Araratan bi cî bûbûn. Sûbariyan di hengamên dîgeran (muhtellf) da li dora Araratan û berbijêr 5 padîşahî serrast kirin : Hûrî, Mîtanî, Nehrî, Alarodî, Xaltî.

Nehriyan di 1.500 B.Z. da Padîşahiya xwe sazandibû. Ermenî gava ji Tirkiyê koçûbar kir hatin dora Rewanê. Nehrî 1000 sal bû ku xwediyên Padîşahiyeke xurt bûn û paytextê wan bajarê Tospa = Wan bû, li Araratan 1000 sal bû ku padîşahî dikir. Nehriyan ta Torosan û Deryayê Sipî ferweranî dikir. Bi mêranî û dilîriya xwe nav dabûn. Di dîrokan da heye Padîşahê zorba "Salmanazarê duyim" ê Asoran li çar aliyê xwe fermanferma bûbû, lê bi Nehriyan ra melsokî (mudara) dikir. Di sala 612 B.Z. da, padîşahê Kurdan Key Aksar paytextê Asoran vekirand, Imparatoriya fêris a Kurdistan serrast kir, xwehermenda Nehriyan jî bû

libatekî imparatoriya Kurdan. Iro jî li dora Hekkarî hene, wek ên bavpîrên xwe, mêrxas in û Kurd in.
Ji van nivîsandinên jorîn xuya dibe : Sûbarî bavpîrên Nehriyan in û Sûbarî B.Z. 6000 sal li Araratan bi cî bûbûn. Nehriyan B.Z. 1500 sal li Tospa = Wan padîşahî dikir. Di 1278 B.Z. da Tîklat Palazarê duyim bû Padîşahê Asor û bi Nehriyan ra melsokî (mudara) .dikir, ano Nehrî di 1278 da padîşahiyeke xurt bû, li Araratan û li Wanê padîşahî dikir. Ermenî di wan hengaman da li Yewnanistanê, li Trakya, bûn û 1000 sal bi şûnda ji Trakya koç bar

www.netewe CO
kir, hatin Asyayê, li dora Rewanê bi cî bûn. Weke rojê eşkere ye, dîrokzanên Ermeniyan ji nîgaşa (xeyal> xwe deranîne û Nehriyên Kurd kirine Ermenî!
2- Di nivîs warên dîrokên Ermeniyan da nivîsandî ye ku bajarê kevnare yê Amed (Diyarbekir) Dikranê mezin ava kiriye. Ev nîgaş jî çewt e : bajarê Amed ji zayîna Isa 4-5 hezar sal bertir ava bû û bajarekî binavûdeng bû. Avakerê Amed kî ye û çigavê ava bûye? Tukes nizane. Tê gotin ku padîşahê Akadan, Sargon, padîşahê yekim, ava kiriye. Pir dibe ku Hûriyan, an Medan ava kiribin û ev her du gel Kurd in.
Ji dîroknivîsên Ermeniyan pê va, tu dîroknivîs - ne Ewropayî, ne jî Asyayî - ji bo Amed "Dlkranagêr " ne gotiye. Dikran Padîşah ji avakirina Amed 4-5 hezar sal bi şûnda ji diya xwe bûye ! Ji nivîs wara me benda Arşakyan bi baldarî bixwînin. Ji bo Dikran Padîşah zanişweriya zûlandî (rnufassal) û rast hûn dê bixwînin.
300 - 400 sal B.Z., dîrokzanê yewnanî, general Ksênofon, ji Kurdistan û Ermenistan derbas bûye. Li ser vê geştecenga xwe nivîswareke dîrokî nivîsiye. Navê vê nivîswarê "Vegera deh hezaran" e Û tê da li ser tuwandarî û dilîriya Kurdan û dasendên (munasebet) wan bi Ermeniyan ra zanişwerî heye. Xwendina vê nivîs warê pir behre û hêja ye.
Eger em bixwazin hemî çewt Û xwariyên ku dîrokzanên Ermeniyan bi çelweriyên bê endaze nivîsîne û di nixûnên Kurdan da peyvine bê teşe belav kirine durust bikin, divê em nlvîswareke fêris Û bi sedan rûpel binivîsînin.

Ji bo îro em navên vê kisseyê evçend direj bikin. Em dê nuha bi vî çendikî qîma xwe bînin. Lê bitenê, em ji endişmendan û profesor û dîrokzanên Ermeniyan ra - çêtirê wî ji gelê ermenî ra - berê xwe didin û van rêzên jêrîn pêşkêş dikin : Me di destpêka nivîs wara xwe da nivîsîbû ku arkêologên
- 244 -
amerîkan. Ingilîz û fransiz, ji 1924 vir da, li Îranê û li kişwerên kevn ên Osmaniyan, bi endazeke fereh custuger (teharri) kirin û îro jî ji kolana xwe bi şûnda ne mane. Di van kişweran da - Îran, Iraq, Sûriya, Filistîn, Yemen, Trakya - 4S sal e ku koş û xebateke zor dikin. Lê, jêderên (netîce) koş û xebtên evçend giran beyhûde ne çûn, berxudar bûn, gihîştin armanca xwe : kevne rêç (asarên kevn) û nîşane û şope peyda kirin.
Ev nîşane û şopeyên ku di nav 4S salan da van arkêologan deranîn meydanê pir çewtî û xwariyên nivîs warên dîrokên kevn eşkere kirin û aşkartin.
Nivîswarên kevn ên dîrokan, ji bo nivîsandina gertevên sedsalên kevnare, xwe dispartin bawervajî û çîrçîrokan û gûmanên beyhûde. Loma. nivîs warên dîrokên berî 4S salan hatine nivîsandin pir çewt û xwar in.
Bi ponj û endîşa me. eger ji bo demeke hindik bibe jî, divê em nivîswarên kevn bidin alîkî û nivîswarên nû yên Ewrupayî, Amerîkanî û Rohilatzanan bixwînin.
Manivîsên (eser) van zanişmendan bixwînin ! Wan bi zanebûnên xwe yên kevn ku hûn ji bawerişên kevnare hîn bûbûn berhevînin (rnuqabe le bikin) ! Zanibûna xwe ya kevn durust bikin ! Ji çewlerî, hişkbawerî, şovênî û kîndarî xwe bidin alîkî ! Bi xwînsarî li rastiyê bigerin !
Kurd û Ermenî du gelên hevsî (cîran) ne. Her du gel jî gelên bedbexttirên cihanê ne. Di vê sedsala 20'an da gelên Afrîqa bûn xudanên serxwebûnê, lê ev her du gel hêj ji dîl bûnê rizgar ne bûne! Xwejber, tûdevaniya (cumhûriyet) Rewanê ku teva Hevbenda Sovyetan e divê em jê der bikin. Bi me, Kurd û Ermenî ku hevnejad, heverd û hevsî ne, divê dev ji Ifrat û hişkbaweriyê berdin, destê xwe bi hevdin, bikoşin û ji destê emperyalîstan xwe rizgar bikin.
- 245 -

DASENDA (MUNASEBET> KURD Û FARIS

Ji bo me bedih (deyn) bû ku em li dawiya ruviswara xwe di gihaja dasenda Kurd û Faris da çend pirsan binivîsînin û ponja xwe di vê kisseya bergiran da bi awakî berjendî (wazlh) diyar bikin.

Kesbllindên ku nivîs wara min, ano nivîs wara dîroka ku min "Dîroka Kurdistan a kurteblr" nav lê kiriye, bixwînin, dê bi hêsanî fehm bikin ku giş kisseyên ku di vê nivîs warê da hatine nivîsandin û giş bendên ku di van kissan da hatine gotin, heya bi givirkî hatine peyivîn, xwe spartine nîşane û aşkarişan. Min di vinîswara xwe da yek pirs ji ber xwe ne nivîsandiye.

Pey tumandina (lkrnal) vê nivîs wara ku bi spartina maf û vêrastan min nivîsiye, eşkere xuya bû ku pismamên Kurdan, Ecem ev çend vekirandin û ve sandin û canfeşandin û xwînrijandinên Kurdan kirine malê xwe ! Evçend kam werî û pîrozbextiyên firazwer û giranber ku bi xwîna Kurdan, bi koş û xebt û werzişên kurên Kurdan hatine meydanê, Ecem ji xwe ra kiriye bermêv û xistiye dîrokan û nivîs waran !

Bi hengave (eynî zeman), dîrokzanên rohilat û roava jî ji sedsalan ve bê peygerdin (tahqîq) û bê hûrandin (tetqîq) ev firazbextî û kamwerî û şehrevaniyên ev çend gewre û gurîpaş ku bi xwînfeşandina Kurdê qehreman hatiye meydanê li ser navê Ecem nivîsîne û kirine nivîs warên xwe, û evçend bêdadî û stemkerî ji Kurdan ra rewa dîtine.

Hemj, navek jî çapînoz kirine : "Ancienne Perse", "Fursî qedîm", "Eski Faris" gotine !

- 247 -

Çawa ku "pirsa pêşiyan" dibêje : "Meriv ji kîjan pitikê vegere kare" û "jimardeka xwar ji Bexdê vedigere", min jî got ez dê bikoşim, biwerizim û bixebitim, maf û vêrastê biderînim, şapînoz û virên Eceman derînim meydanê, rastiyê biaşkirînim, bangdim gişî cihanê. Di nivîs wara xwe da, min di gelek ciyan da nivîsandibû ku Kurdan bi xebtûkoşên dijwar, bi leyandinên xwîna xwe ya sor a wek çem û rûbaran evçend kamwerî û pîrozbextî û cihangîriyên pirfiraz û ronak xistin destê xwe. Kurmamê Kurd, kurmamê pepûk û belengaz ê Ecem bê xebtûkoş evçend mezinayî kiriye dastê (mal) xwe û bê şerm û fedî nivîsiye mviswaran: lê ev

destdirêjayî Û. bernixûniyên Farisan bazareke ne sivik û hêsanî ye. Ev kisse canwej û bergiran e. Loma min nivîsandina vê bendê hanê, benda "Dasenda Kurd û Faris" pêtiviyeke (teslîh) bergiran dît.

1- BICYBt1NA KURDAN LI ARARA TAN

Kurdan, Berê Zayîna îsa bi hezaran salan - 10.000, belkî jî hîn bêtir - di hengama koçbariya gişkî da, wek hemû pismamên xwe yên endoawrûpayî, Iskandinavya berda, serejêr bûn, hatin Araratan. Kurdan, pey ku van ciyan ji xwe ra kirin nîştiman, warê xwe fireh kir, ber bi roava, nîvro û rohilat belav bûn. Kurdên ku li Araratan man, bajarê Tospa, ano Wan, ava kir û ji xwe ra kir paytext. Kurdên ku berê xwe da rohilat, dora Deryayê Kaspînê, ano Kaslyan, girt Û gihîştin sînorên Hindistanê, bajarê Belx ava kir Û. ev bajar bû. Paytextê wan.

Kurdên ku ber bi roava çûbûn, ji Çiyayên Qefqasan heya çiyayên Torosan girt, Sûrîye û. Filistîn jî giş vesandin. Evên ku berê xwe dabûn nîvro, Zagrosan, dora Urmiyê girt û. serejêr bûn û pehnavên Dicle û Ferêt stendin, gihîştin kenarê Deryayê Faris. Lê, di wan deman da hêj Faris li meydanê tu nebû.

2- LI M"E:ZOPOTAMY A XWEHERMEND"E:N KÛTIY AN Û LOLOYAN Û DASENDA KURD Û FARIS

4000 sal B.Z., dema ku Kurdan deverên nîvroyê Araratan leyandin, li pehnavên Dicle û Ferêt rastî sê xwehermendên pirr şehrevan (medenî) hatin :

Sûmîr, Akad û Elam.

Kurd, di demeke hindik da, bûn xudanên van her sê kişweran. Di van hengaman da, hêj li ruyê cihanê Faris, Ecem, Kildan û Asor tune bûn. Dengê van her sê hawuşan hêj tukes ne bihîstibû (38).

Di 1700 B.Z. da, Kûtî û Loloyan bi Sûmîr, Akad û Elaman ra şer kir û ew şikandin, di kişwerên wan da xwehermendên Kûtlyûm û Lolobûm serrast kirin. X wehermendên ku Kurdan - Kûtî û Lolo - vekirandibûn ji yên Sûmîr û Akadên ku pêşveçûyîtirên cihanê bûn, di zaniş û agahî û şehrevaniyê da, di demeke hindik da ji wan buhurtin.

Paşê, nêzîkî du hezar sal bi şûnda, di rexên Ferêt da Kildanî û yên Diclê da Asor xuya bûn. Di kenarên Deryayê Faris da jî Faris peyda bûn. Ano, bavpîrê Farisan, Klyûmers, di van hengaman da zaye. Bi bawermendiya Farisan, Klyûmers bavpîrê hemû enzanan bû ! Dîrokên cihanê giş - xweşber dîrokzanên Eceman rader (must.esna - ji vê angaştinê dikenin û baş bawer in ku tiştên han çewtbawerî Û efsane ne ! Ne Kiyûmers heye, ne jî bavpîrên wî !

Q paşê, bi angaştên Eceman, Kiyûmers Padîşahê pêşîn ê Farisan e û malbata padîşahan serrast kiriye. Ez durust û nedurustiya bawermendiyên Eceman di gihaja Kiyûmers û padîşahiyan da bersenc (munaqeşe) nakim. Ji bo vê yekê tu vêt (Iuzûm) nabînim. Lê, di gihaja Pişdadiyan da pirseke bergiran heye. Ji 2371 salnave - 400 sal B.Z. - di nivîs warên dîrokan da, ên destnivîs û yên çapkirî, ne hatiye nivîsandin. Û ez di vê sosirê da mame ku tukes, tu dîrokzan - ên rohilat û yên roava - bernihêra (dlqqet) vê pirsa ev çend nerxber ne bûye ! Efsûs û

pir efsûs ku bi hezaran dîrokzan van pirsên ev çend eşkere di nivîs waran da dîtine, xwendine, lê fehm ne kirine, yaxut guh ne dane ! Evçend pirs gelo çi ne ?

400 sal B.Z. ano 2371 sal berê hingî, Hêrêdot, pîrê dîrokzanan, geştevan (seyyah) Û zanayê yewnanî yê binavûdeng di hemî cihanê da, geştevanî dikir û li çaraliyên gîtî (dunya) digeriya. Wî çi bidîta, çi bibihîsta, dinivîsand û bi nivîs warên dîrokan van gertevên kişweran û gelan belav dikir. Dîroka Merdûx, derpêç 1, rûpel 180, çend pirsên ku Hêrêdot berî 2371 salan li ser Farisan û Farisistan gotiye dinivîsîne : "Farisan di niştimanê xwe da, ano li dora tengava Faris da, bi cotkarî û şivanî kariwer bûn. Carna bi serxwebûnî jîne, lê pir caran berbendên (tabî) Pişdadiyan bûn. Yaxut, ji xwehermenda Mad ra, Kildan û Asor ra bac dida, û tucaran ji axa xwe derneketine derva".

2371 sal berî hingî, Hêrêdot , dîrokzanê yewnanî, çûbû welatê Farisan, tiştên ku li van doran dîtibûn û bihîst.ibûn giş nivîsandibûn. Gotinên jorîn ji nivîs warên Hêrêdotê bêalî û dîrokzanên din hatine girtin û derkenar

bûne. Loma, ev pirsên han li ba dîrokzanan gelek buhadar in û herkes bawer e ku ev pirs rast in.
Ev gotinên Hêrêdot "Faris pir caran berbendên Pişdadiyan bûn" rind dlaşkirînin ku Faris ne Pişdadî bûn, berbendên Pişdadiyan bûn.
Min, gava di nivîs warên dîrokan da van pirsên Hêrêdot xwendin, tavil zexelî, lîzbazî û çerpdestî (meharet) fehm kir. Min dest bi pêşekirina (tetqîq) van xap û dekan kirin. Min bicarek tûma rastiyê fehm kir : Farisên ku ne bi serê xwe bûn, ano serxwebûniya wan tune bû, destbendên Pişdadiyan bûn. Wan bac dida xwehermendên Mad, Kildan û Asoran. Gava hêj na. dest bi nivîsandina dîroka xwe kir, rahişt fend û fûtan, bend û virran ! xwe ji sextekarî û xapînokî bi şûnda ne da ! û bi çerp-
- 250 -
destî 0 bi dest.lîzî destbendiya xwe çirand, li ciye şehriyarê xwe raniştin 0 xwe kir Padîşahî ! Farisên bendeyên Pişdadiyan ji bende bûna xwe şerm kirine û bendetiya xwe ne gotine !
Rastî eve. Xwehermenda Pişdadî bi xurtî 0 camêrî û şerevanî padîşahê KOtiyan, Anrî- Daprîz, bûbû. Di 3700 B.Z. da, bi şikandinên Sûmîr 0 Akad, van padîşahên Kurdan xwehermenda Kûtlyûm sazandibûn. Pişdadî Gûtiyûm bixwe ne.
Pirsa Pişdadiyan pirseke weşbestan (şair) e. Pirsa rastîn, pirsa dîrokî "Gûtlyûm" e. Ev vêrast li ba dîrokzan 0 rohilatzan 0 arkêologan pezirandî ne. Eva rastî: Pişdadî Kurd e, ne Faris e : di sedsalên 38 B.Z. da "Dasenda Kurd 0 Faris" !
3- VEKIRANDINA BABIL BI DEST!: KASIY AN IMPERA TORIY A MÎTAN Û PADlşAHIY!:N DIN ÊN KEY ANIY AN
Û DI VAN DEMAN DA "DASENDA KURD Û FARIS"
Pey Lolobûm 0 Kûtlyûm, Kasiyan ku birrekî KOtî bûn di sala 1965 B.Z. da Babîl vekirand, li Babîlê 700 sal ferweranî kir 0 bi navê Kardûnya imperatoriyek serrast kir.
Şanên Kasiyan ne bitenê mêranî 0 cengawerî bûn. Kasî çiçend şerker 0 bajargîr bûn, ewçend jî şehrevan û enzanperwer bûn. Gava Kurdan Babîl vekirand, fermanwerî kir destên xwe, Babîl ji berê xemilandîtir û mezintir kir. Kasiyan hesp anîn Babîlê - gerdûnşerên Babîliyan ker girêdidan -, ji

Babîliyan ra lixwekirina paçên hevisandî kir. Babîlî ustupêçên rengîn 0 bi gulvadûn ji Kurdan hîn bûn (di nivîs wara me da li şehrevaniyên Kasiyan rohilatzanên awrupayî pir tişt nivîsîne, bi camêriya xwe bixwînin).
Di vê hengamê bixwe da, Mîtanî ku cardin birrekî KOtî bûn Imperatoriyek serrast kir. Imperatoriya
- 251 -
Mîtaniyan ji hundirên Asor ta sînorên Misrê direj dibû. Mîtaniyan bi sedsalan bi Hitît û Misriyan ra ceng kir. Şerên Mîtanî û Misriyan tu jêder (netîce) ne da, loma herdu alî jî qîma xwe li aşîtiyê anî. Bakurrê Sûriyê ma ji Kurdan ra, Nîvroyê Sûriyê bû yê Misriyan. Mîtanî û Misriyan bi hev ra "parazî û êrîşî" peymannave girêda. Sê Fîrewnên Misrî bi prensesên Kurdan ra jinmêrî danî. Prensesa Kurdan a sêyim banûşaha binavûdeng "Nefertîtî" ye. Firewnê Misrê ji vê Banûşaha Kurd ra "ehram"ek ava kir. Navê wê li mala bavê wê "Tadu-Hepa" bû. Paşê, gava bû banûşaha Misrê, Firewn navê wê kir Nefertîtî.
Ji van nivîsandinên min pir baş xuya dibe ku Kurd hêj di van deman da - 4000 sal B.Z. - li hemberê xwe rastî gelek xwehermend û gelên dijmin hatine:
Sûmîr, Akad, Elam, Hitît, Misr ... Kurdên Mîtanî ji van peymaneyên ku bi Misriyan ra girêdan û bi wan ra merivatî danî tu sûd û behre ne dît. Misrî bêbext derketin, ji hevalbendên xwe Mîtaniyan ra alîkarî ne kir. Hitît li pey hev êrîş dikirin. Şerên Mîtanî û Hitît tucaran kêm ne dibûn. Misrî yek car ne çûn gaziya hevalbendê xwe !
Cengên Mîtanî û Hitît bi sedsalan direj kir. Paşê Mîtanî şikiyan, Imparatoriya Mîtanî wenda bû, pirraniya Mîtaniyan kişiyan Zagrosan û Araratan, ba birayên xwe.
Berî wendabûna xwehermenda Mîtanî, padîşahên Asoran xwehermendeke leşkervan û xurt anî meydanê, Padîşahên Asor kopa xwe ya pêşîn li şahînşahiya Kasiyan lêxist ! Pirrên Kasiyan bi padîşahên xwe va hilkişiyan Zagrosan. Hinek ji Kasiyan gihîştin xwehermenda Anzan ku Kûtiyan ji mêj ve li bakurrê Elam sazandibû.
Kasiyên ku klşiyabûn Zagrosan çendakî bi şûnda vegeriyan û şerê Asoran kir, ew şikandin û cardin li Babîlê sed sal fermanferma bûn.

- 252 -
Paşê, careke din Asor bû xwehermendeke xurt û bi ferûtab, Padîşahê Asor bi awakî nedîtî, bi malmîratî, şikencdarî û zorbatî dest bi karûkoş kir. Hawîrdora xwe tirsand, rojberoj xurttir û dijwartir bû. Jimarên cengawer ên wan ji zû da sed hezaran derbas kiribûn. Leşkerên van Padîşahên Asoran mêr bûn, şerevan bûn, pir rind zanawer û karûbarklrî bûn. Dora paytextê xwe, bajarê Nînwa, bi bendeke sed kîlometre dirêj pêçabû. Ji bo bicîkirina sed hezaran leşker cengcih û dej û barû ava kiribûn.
X wehermenda Asor ev ferûtabê wêranker û zorba, di demeke hindik da Mêzopotamya giş, kiş werê Hltît., Anadol, Sûriya, Filistîn, Iran û Misr vesendin. Asor di van deman da xurttir, zortir û firehtirên Imparatoriyan serrast kiribû.
Germîçanka vê xwehermendê axa Kurdistan bixwe bû ! Hem jî armanca mezin a Asoran wendakirina Kurdistan bû !
Kurd, pey sazandina xwehermenda Asor, ji sedsalan bêtir rojek asûdegî û bihindarî ne dît. Kurdan rojekê bê ceng, bê kuştin û bê xwînrijandin derbas ne kir! Bi rastî, xwehermenda Asor di axa Kurdistanê da bingeha xwe danîbû. Kurdên Kûtî ev kişwer ji Sûmlr, Akad û Elam bi xwîna sor stendibûn ! 2500 sal bû ku ev erd niştimanê Kurdan bûn ! Kurdan berî ku Nînwa ava bibe - 2000 sal berê - ji Araratan heta Sûriya û Filistînê vesendlbû, di van kişweran da 2000 sal fermanferma bûn.
Kûtî- Amerdî li bakurê Elam xwehermenda Anzan serrast kiribû û Kasî jî li Babîlê ferweranî dikir. Di van hengaman da, Sûbarî ku birrekî Kûtî ne, li Araratan, li roavayê Araratan û li kiş werê Nîfast - Bedlîs, Diyarbekir, Dêrsim - ta li Torosan û AntîTorosan gihîştibûn û xwehermend, ferweran û mîrî sazandibûn : Mîtanî, Hûrî Narî, Mûşkî, Xaltî û Alarodî li rohilatê Araratan: Madê Biçûk, Anzan, Mannaî û Madê Fêris imparatorî, şehriyarî û ferweranî çê kiribûn. Sînorên Mad gihîştibûn Hindistanê, çemê Send. Paytextê wan ê bertir bajarê Belx bû.
- 253 -
Wuha ye ! Babil 0 Asor, ev gelên biyanî, xwe xistfbû navika Kurdistanê ! Kurdan dê çi bikira ? Li ber kujrişa mezin, Kurd dê çi tevger bistenda ? Li pêş vê ordiya mezin mêr 0 cengawer bi tabûfer û bestûbend , rapêçayî 0

karûbarklrî dê çi bikira? Li van sipahan 0 li padîşahên wan ên xurt 0 xwînrêj û bêdad dê serfirû bikira an Kurd dê xwe bavêta bextê wan ? Na ! Kurd rûreşlyên wusa nake ! Kurd gendûgemarî, nizmpayetî li xwe danaynîne !

Asor li bin fermana yek padîşahê zormend 0 ferûtab pir xurt 0 gewre bO. Di van hengaman da, li cihanê xurtiyek di vê endazê da tu nebû.

Herçend ku di van deman da du imparatoriyên xurt û mezin ên Kurdan, Mîtanî 0 Kasî, ji meydanên koşiş 0 werziş cuda bûbûn, dîlawerên Kurdan bê umîd ne bûn, Ji van her du xwehermendên mezin pêva, padîşahên din hebûn, mîrên din heb On 0 li derûberan belavbûyî giloreyên din ên Kurdan hebûn, Ji Sûbariyan, ji blrrên KOtiyan, Nayrî, Mûşkî, Xaltî û Alarodî, ji Araratan ta Torosan ferweranî dikir. Li Nîfasê bermayiyên Mîtaniyan 0 bê jimar mîrên HOriyan hebûn. Wêda, li aliyê rohilatê, Anzaniyan (Kûtî-Amerdî), Kasî, Lolo, Mannaî, Kimrî 0 paşiya paşîn jî Kurtî (Madê fêris 0 birrên wî) hebûn.

Belê, çawa ku me li jor goti bû , Kurdan her sê aliyên xwehermenda fêris a Asor glrttbûn. Ev xwehermendên Kurdan 0 ferweranên wan, mîr 0 gilo reyên derûberan ji hezar 0 ev çend sal da asûde ne man, aştî ne dît, bihn ne da xwe, bi leşkerên zorewer ên Asoran xerpişîn, kopişîn 0 xwîna xwe, malê xwe dirîx ne kirin. Hezar 0 evqas sal şer kir, ceng kir, pevçûn kir, birîn kir, hatin birîn kirin 0 hatin kuştin, lê ne reviyan !

Hezaran hezar kurên Kurdan ji bo birayên xwe, ji bo rûmet 0 namûsa xwe bûn gorî. Padîşahên zorba yên Asoran, ordî 0 sipahên dêwasa yên Asoran

- 254 -

Kurdistan seraser wêran kir. Lê, padîşahên Asor Q xwehermenda Asor Kurd "nakawt" ne kir !

Asoran Kurd kuştin lê ne pelişandin ! Ji şermsariya radestê (teslîm) ra qîma xwe ne anî ! Ta dawiyê, Kurd pêdarî (sebat) kir. Kurd bi her renc, şikenc Q êş qîma xwe anî : bi tunebûnê, bi birçîtî, tazîtî, xwasî, bi hertiştî qîma xwe anî, ji bo yek demik bixwe ji xurtiya wî ra, mêraniya wî ra, qehremaniya wî ra ziyan ne hat.

Dawiya dawîn, Kurd ji ceng Q pevçûn Q xerpişên hezar û ev çend salan bi, serbestî derket ! neyarê xwe yê hezaran sal, Asorê zorba, şikand Q

wenda kir ! Navê Key Aksar, şahînşahê Kurdan, di dîrokan da bi kişwergîrî hat nivîsandin !
Min li vir koşiş Q pehlewaniyên hezar sal ên Kurdan bi kurtebirî derkenar kirin. Bi vêrastî, di nivîswara min da ev gertevên han pejilandî nivîsandî ne. Xweş ber, li vir bi kurtebirî, di nivîsandina min da meramek heye : ez dixwazim xwendevanên min bi hêsanî van çend pelan bixwînin û zû bi zû fehm bikin ku Kurd di nav 6000 sal da çiçend canfeşanî kiriye, çawa wek çeman xwîna xwe leyandiye û ji bo nişimanê xwe çawa bi milyonan Kurd xwe kirine gorî.
Û cardin merama min eve: xwendevanên min zanibin ku li dawiyê, bi van ceng Q koşişên xwînalûd û dilgudaz, hin behremendî kete destê Kurd Q Faris. Faris bi çar nex û deh nex ji van encaman behrtemen bû. Lê gelo Faris di van ceng û koşişên dirêj ên hezaran salan da çi canfeşanî Q karûkoşî kir?
Di şer û koşişên Sûmîr, Akad Q Elam da, bûniş û tevgerên Faris çi bûn ? Gava Hltît , Misr Q Kildan, nemaza Asor ku wek gurê devbixwîn dirêjî welatê wan kir, Paris li ku, çi gav û çawa bi van neyaran ra şer kir ? Û xwendevanên min bizanibin di van salan da "Dasenda Kurd û Faris" çi bû, çawa bû.
- 255 -
Lê, ez pir baş zanim ku xwendevanên min ji vê dîrokçeya 6000 sale ya Kurdan, ya pir xwînrêj u pir dijwar, ku min ji wan ra jimartin, tiştê yegane ku jê hîn bûn eve: Farisan di van 6000 salan da, di hengama koşiş û xerpişên Kurdan ên pir dijwar û hovnak da, tu havil û tevger ne kir, destên xwe ne dan tu sar û germiyê û alîkariyeke biçûçik ji wan çê ne bû ! yek dilop xwîn ji wan ne rijiya !
Xwendevanên hêja Gelo we têderxist ? Hûn têgihîştin Kurd kete çi bûnlşê ? Kurd di çi bûnişê da ye ? Bûnişa Kurd çi bûnişeke dilgudaz û hovnak e ? Kurd bi neyaran ra şer kir, wek leyiyan xwîna sor şûşikand, nişiman û axa xwe fireh kir, sînorê Kurdistanê çû xwe hi hand Hindistanê. Ji aliyê roava çû xwe gihand Deryayên Reş û Sipî. Çiyayên Qefqasan bûn sînorê Kurdistana bakurr. Kurd ji aliyê jêrîn bûn hevsiyên Hebeşistanê. Di van hengaman da nişimanê Kurdan bû gewretirê imparatoriyên cihanê.

Kurdan di van şeş hezar salan da bitenê şer û ceng ne kir. Aştî jî kir, peyman jî girêdan. Carna dostanî jî sazand, bi Fîrewnan, bi Qralan merivatî jî danî. Kurd di van şêst sedsalan da bi gel û hawişên bê jimar ra hatin mlzlşandin (temas). Çawa ku ji şehrevanî, pîşewerî, hunerweriyên van hawişan behremend bûn, ji şehrevaniya xwe jî, ji zan iş û agahiyên xwe jî gel û hawişên din behremend kirin.
Kurd tenê bi mêranî, bi çekbazî, di şeran da bi hunerwerî, di meydanên cengan da bi pêdarî û tebûtiya xwe xweşnav û xweşdeng ne bû. Kurd di bazirganî, pîşewerî, avadanî, zaniş û hay darî, bi kurtebirî Kurd bi karûkoşan û bi şehrevanî û hunerweriyê jî jêhatîbûna xwe nîşan da.
Padîşahên Asor, bi nivîsandinên ku li ser zinar û beryadan kolane, pir caran Kurd pesinandine û

hergav ji bo avakirin û xemilandina Nînwa endezan, avadanker û pîşewer ji Kûtî û Loloyan dibirin û bi niwaziş û zêran ew dilxweş dikirin. Rohilatzanên Awrûpayî jî di nivîs warên xwe da hunerwerî û karaşînayiyên Kurdan pesinandine.
Xwendevanên camêr ! Min ji şeş hezar sal beriya zayîna Îsa ta vekirandina Nînwa bi destê Kurdan, ano di van şêst sedsalan da, "Dasendên Kurd û Faris" li ber çavên we raxistin. We jî wek min dît ku Kurdan ceng kir, xwîn rijand, koşiyan û xebitîn. Farisan - çawa ku di herşeya venijandî (merbût) xuya ye - di navbera kenarê Tengava Faris û Pasargadê da û di erdekî teng da cî girtibû û jimara wan jî ji dehan yek a Kurdan hindiktir bû û hîç ne koşiyan, ne xebitîn, dilopek ji xwîna xwe ne rijand; çawa ku Hêrêdot gotiye, bac dida xwehermendên Mad, Kilde û Asor, cotkar bûn û tucar ji erdê xwe derneketibûn û berbendên Padîşahan, ano Kûtiyan, bûn. Çawa ku Hêrêdot dibêje, Paris hîç ji welatê xwe derneketibûn, bi gel û hawuşên din hîç ne hatibûn mizişandin (temas), çar hezar sal jîneke yabanî derbas kir. Ev jîna wan hîç ne guherî, tum şivan bûn û şivan man.
Xwendevanên hêja ! Hûn jî wek min bibînin hawişên Faris wek kûsiyan di nav qalikê xwe da jîna xwe derbas kir, tu nîşaneya pêşveçûnê ji wan xuya ne bû. Çar hezar sal dûrî şehrevaniya cihanê man, bi belengazî Û tirsonekî bac da, canê xwe yê şêrîn rizgar kir.

Eger em bên kişiş û werzrşen Kurdan, ev Kurdên jîndar û çalak û hişyar ji şeş hezar salan ve - 2000 sal berî peydabûna Farisan - demikek bê xebt, bê pevçûn derbas ne kir. Kurd ji bo jîn, jîndarî, ji bo hebûn û manişa enzan, çi divabû jê bi şûnda ne man : bi hezaran keriyên hesp, ga, çêlek û pez diçêrandin, cotkarên jêhatî bûn, baxçevanî, rezvanî dikirin, gund û bajar ava dikirin, avadanî sazandin û şehrevaniyeke zor anî meydanê.
- 257 -
Lê Kurd berî hertiştî divabû welatê xwe, rûmet û namûsa xwe qedxen bike û ji neyaran biparêze. Kurd ji kêmbextiya xwe rastî neyarên fêris, xurt û şerevan hatibûn : Sûmîr, Akad, Elam, Hitît, Misr, Kildan, Asor ... Kurd wek Farisan payejêrî û şermsarî ne kir, rûreşî ne pezirand û bednavî ne anî ser xwe. Kurd xwîna xwe rijand, canfeşanî kir, ji ber neyaran ne reviya, navê revê ne anî ser xwe !
Kurd di mêraniyê da, di şerevanî û cengaweriyê da navûdeng bir. Lê Kurd ku di şer û pevçûnê da pir zorawer û dijwar e, carê destê wî ne çû birîndarekî, carê ji girtî û dîlan ra dest bilind ne kir. Ji kêmketiyan ra, naçîz û rebenan ra arîkarî kir, dilovanî kir, bû mihrivan ! Nemaza namûs û dawpaqijî li ba Kurdan homanwer, pirfiraz û giramîdar (muhterem) bû û hergav ji çepelî û kirêtiyê dûr dima.
Ev Kurdê di1îr û cengawer, dilovan û mihrivan di şêst sedsalan da bû xudanê kişwerekî zaf mezin û gewre, bi gel û hewuşên bê jimar mlzlşî, kişwer û bajar dîtin. bi ordiyan û leşkeran ra danûstend; bi zana û feylesofan, bi weşbest û nivîsmendan, bi bazirgan û hunerweran ra rabû û rûnişt. Ji her tiştî, ji her kesî para xwe stend, zanebûn û hunera xwe jî flrote wan. Kurd bi zîrekî û lêhatiniya xwe di her birr û zûlê şehrevaniyê da pêş ve çû, bişkivî, wek Farisan çar hezar sal tembel û bê tevger ne ma û rûnenişt !
Ez ji bo aşkartina van angaştên xwe mîneyên (mîsal) jêrîn ji zanayên Rohilat û Roava distînim û dinivîsînim, û ez dê dawiya birra sêyim "Dasenda Kurd û Faris" bînim û dest bi nivîsandina birra çarim bikim :Dîroka Merdûx, derpêç 1, rûpel 148 :
"Di 1288 B.Z. da, Padîşahê Asoran, Salmanazar, bi Kûtiyan ra pir caran şer kiriye. Ev padîşah ji Kûtiyan ra ewha dibêje : "Kût.iyûrn, ji Araratan ta

Torosan dirêj dibû. Kûtî di ezmanên van hengaman da wek stêran diçirisîn. Bitenê ne di lewendiyê da, belkî di perjendî (xurtbûn), sûrgivêjî (şiddet), hovnakî (dehşet) û perçokiyê (texrîb kirin) da jî bi navûdeng bûn".

- 258 -

4 - DERCIKIRINA KEY AZDIY AK, KEY XUSREWl:

MEZIN Q PEYHA TIYl:N wt

ISKENDERl: MEZIN Q DASENDA KURD Q FARIS

Di danava (bahs) duyim a "Dasenda Kurd û Faris" da, min zexeliyên Farisan danîn meydanê û danava sêyim da jî min aş kart ku Kurd şeş hezar sal bi pênc neyarên xurt û fêris ra bê aram û bê bihnvedan şerine dijwar kirin !

Nuha dest bi danava çarim a "Dasenda Kurd û Faris" dikim. Lê, ji bo ku ez karibim xahez (doz) û mafê Kurdan bi awakî zelal û diyar biaşkirînim, divê ez li ser rûyeya (usûl) nivîsandina dîrokên kevnare û dîrokên nû hinek zanişwerî bidim : heya berî du sed salan, pirên zanişweriyên kevnare yên dîrokan - gelên cihanê giş - ji efsane û çîvanok û çîrçîrokan li hev dianîn. Lê, du sed sal vir de, Awrupayiyên jêhatî û zana, çawa ku di her zanişwerî da pir pêş ve çûn, di zanişweriya dîrokê da jî gelek pêş ve çûn.

Bi sîdariya zanayên A wrupayiyan, pêşveçûnên zanişweriyên arkêolojî, antropolojî ... bi gavên dêwane pêş ve çûn û nivîs warên dîrokên kevnare ku bi çewtbawerî û çîrçîrokan tije bûn û hebaneke çewtbaweriya çîrçîrokan bûn çiriyan û bûn zîrûzeber,

Belê, zana û arkêologên Awrupî ji du sed sal vir da li çar aliyên cihanê gerdpiş (teherrî) kirin Û kolanên zor çê kirin. Ji bo ku dîrokên kevnare yên enzanan ji çewtbawerî Û efsane û çîrçîrokan pak bikin û bi awakî durust û xura bînin meydanê, gelek emek dan, pir zêr rijandin. Ev Awrupayiyên xebatker û jêhatî û zana îro, ji berê bêtir, canfeşanî dikin û dikoşin.

Nemaza ji girêdana peymana Lozan bi şûn da - Peymana. Aştî ku Awrûpiyan û Mustafa Kemal di sala 1923 da girêda - ji Emerîka, Fransa û Ingiltere

- 259 -

ra destûr hat dayîn ku di kişwerê kevn ê Osmaniyan û Eceman da li kevnerêçan bigerin. Ji zana û arkêologan ra Kurdistan bû bergirantira meydana xebatê.
Di perçeyên Kurdistanê : Îran, Iraq, Sûriye û Tirkiye da, ji 1924 heya îro, ano heya 1971, bi gerpiş û kolanên arkêolojîk di gihaja buhêrka Kurdistana kevnare da hezaran perçe "kevne rêç" derketin meydanê. Ciyên bergiran ên ku bûn meydanên kolanê ev der bûn : Ararat, serekaniyên Dicle û Ferêt, bakurrê Diyarbekir, Mêzopotamya, Loristan, Bextiyarî, Hewlêr û dora wê, Mûsil û dora wê, Boxaz-Koy, Cerablûs, Serê Kaniyê ... Li Sûrlye û Filistînê.
Bi sîdariya gerpişên evçend fireh, pir ciyên dîroka Kurdistanê ku ji en zanan ra nenuma û veşartî mabûn derketin meydanê û ronak bûn.
Bi germweriya arkêologên Awrûpayiyan xuya bû ku berî zabûna Îsa bi şeş hezar sal Kurd ji Araratan heya Hindistanê û ta Torosan fermanferma bûn, bajarê Belx Paytextê wan bû. Cardin bi xebtûkoşên zana û arkêologên germewer ên A wrupayiyan hat aşkartin ku di 3700 B.Z. da Padîşahê Kût.iyan, Anrî- Daprîz , Padîşahê Akadan, Naramsîn kurê Sargonê binavûdeng, şikand û Paytextê Akadan, Lakaş, vekirand û xwehermenda Kûtiyûm sazand. Kûtiyan bi sedsalan di vî kişwerî da ferweranî kir. Loloyan jî di van hengaman bixwe da Lolobûm serrast kir. Sarlaq, Padîşahê Kûtlyan, di sala 2800 B.Z. da li bakurê Elamê Padîşahiya Anzan anî meydanê. Di 1977 B.Z. da bi Kildaniyan ra şer kir û ew şikandin, Babî1 vekirand û bi navê Kurdunya xwehermendeke fêris serrast kir. Kurdan li Babîlê 600 sal ferweranî kir. Kasî di sala 1171 B.Z. da, di hengama Tîklatnîn, Padîşahê Asor, bênev (mecbûr) bûn û bi padîşahê xwe va Babîl berdan, kişiyan Zagrosan. Hinek ji Kasiyan gihîştin Anzana ku di sala 2800 B.Z. da Kûtiyan ew berbihev anîbû.
- 260-
Û cardin bi koşiş û germewerî û camêriya zana û arkêo logên Awrûpayiyan hat aşkartin ku di sedsalên 13 û 12im da navê malbata padîsahên ku di Anzanê da ji Kûtî-Amerdiyan ra ferweranî dikir "Texîxî-Xenî" bû. Ev malbat heya 560 B.Z. - dema Padîşahiya Kûrlşê mezin li Kurdistanê gişî - di Anzanê da du hezar sal bêtir ferweranî kir.

Min di danavê padîşahiya Anzanan da nivîsandibû ku di van salan da li Anzanê , di gevera Bextiyariyan da, bi gerpiş û kolanên arkêolojîk di gihaja Kurdan da kevnerêçên pir bergiran derketine. Lê, ez dixwazim vê danavê carek din jî di vê rûpelê da binivîsînim :
Di van salên nêzîk da, li Îranê, li geverê Bextiyariyan, di sê ciyan da : Mala Mîr, Gola fireh, Şkefta Suleyman (39), kolanên arkêo lojîk hatin çê kirin. Çend nlvîstekên pir hêja peyda bûn. Ev nlvîstekên han di gihaja sedsalên 13im û 12im da bûn û ji padîşahê "Texîxî-Xenî-Kûtî-Amerdî" mabûn. Dr Says'ê Hollandî ev nivîs tek wergişandibûn : "Vî Padîşahî, di van nivîstekan da, ji bo xwe Padîşahê Anzan gotiye û avakirina welatê xwe û çêkirina riyan nivîsîne. Ji mabûdên xwe ra spasan dike û aferînan dixwîne, ji bo ku wan kişwerê Anzan jê ra bexş kiriye û ew kiriye padîşahê Anzan û KûtîAmerdan. Pûtên ku ji bo Xudanên xwe çikandine û ji bo wan dast û stranyezdiyên (ilahî) ku li dîwaran neqirandine giştik yek yek jimartine. Navê xwe û malbata xwe wuha dibêje: "Ez ku Texîxî Kûtî-Amerdî padîşahê Xenî me".
Li Anzanê , ji ezbeta "Texîxi-Xenî Kûtî-Amerdî" gelek padîşah ferwanî kiriye. Kûriş , berî ku bibe Key Xusrewê Mezin, Padîşahê Anzan bû, ji ezbeta Texîxî- Xenî - Amerdî bû, û gava zaro bû navê wî "Aglrdad" bû. Dîrokzanên rohilat û roava vê rastiyê ji zû da nivîsiye.
Gava nivîstekên padîşahên Anzan ku di gihaja sedsalên 13im û 12im da bûn di vê nêzîkayiyê da derkete meydanê, zanişmendiya me di gihaja Key

Xusrewê Mezin da bicarek aşkifî. Rohilatzanan bi spartinên van nivîstekan dibêjin : Ezbeta ku ji du hezar sal bêtir li Anzanê padîşahî kiriye, navê wê yê rast "Texîxî-Xenî" ye. Pirsa "Examenî" ji vê gotinê çewtwer bûye.
Bi hêsanî tê gihaştin ku Eceman pirsa "Hexamenşî" şapînoz kiriye, çawa ku bi "sivikdestî" û "çerpdestî" Pêşdadî kirin padîşahên Eceman ! Key Xusrewê "Agirdad", Key Xusrewê Anzanî û Kûtî-Amerdî û Kurd kurê Kurd kirine "Hexamenşî" û padîşahê Pasargadê ! û bi xweşikî ji nav derketin !
Em vê doza vêrast û bi nav bidemînin :

A- Dîroka Merdûx ku di 1906 P.Z. da li Tahranê çap bûye, di derpêç 1, rûpel 181 da wuha dinivîsîne: "navê Kûriş ê vêrast Agirdad e".
Çi aşkartina ferweş ji vê pirsê, ji pirsa "Agirdad" ferweştir çi gotin heye ku bi evçend bişkavtiş (wuzûh) bikare biaşkirîne ku Key Xusrew Kurd e, kurrê Kurdan e ?
Belê, eger Kûriş ne kurrê Kurdan ba, Bav carê navê Kurdan lê dikir ? ji kurrê xwe ra "Agirdad" digot?
Parlsbav ji Fariskurr ra navê Paris. datîne. Eger bavê Kûriş Paris ba, ji kurrê xwe ra "Ateşdad" dê bigota. Ji bo Kurdbûn kurrê Kurdbûna Key Xusrew ji vê ferweştir aşkariş dibe ? Hîç dudilî naxwaze. "Examenî", ano "Texîxî-Xenî", Kurd in û Kûriş , ano Agirdad, kurrê Kurdan e.
B- Dîrokzanên Awrûpayî gişên wan û Rohilatzan yek deng in ku Kûr iş Padîşahê Anzan bû û ne Padîşahê Pasargad bû.
C- Dîroka Merdûx, derpêç 1, rûpel 135 : "Di hengama Padîşahiya Kûriş da, paytextê kiş werê Mad Hemedan bû. Paşê paytextê kişwerê Mad bû Isfahan. Di defterxaneya Isfahan da fermana Kûriş peyda bû.
- 262 -
Ev ferman ji bo nûvandinkirina Quds bû. Di vê fermanê da navê Kûrlş "padîşahê Mad" nivîsandiye. Di Tewratê da, li benda 6im pejilandî ye".
D- Dîroka Merdûx, derpêç 1, rûpel 180 : "Di Tewratê da, nivîs wara Ezra, li benda 6im nivîsandiye Paytextê Kişwerê Mad Paytextê Kûriş e".
E- Û cardin di dîroka "Tarîhî Rîşeyî Kurd" ku li Tehranê çap bûye, rûpel 121, 122 da, Ihsan Nûrî Paşa bi farisî nivîsiye : "Mesûd El Tebenî, di El Esfar da, ezbetên Kurdan jimartine û gotiye ku Ûd Ibn Isfendiyar Ibn Çehr bavpîrê Pişdadiyan e. Ev nivîsvan zanişweriyên xwe ji serê kaniyên Pehlewiyan stendine û bavpîrên Kurdan gihandine şehriyarên Îranê".
"Ev aşkaft.in, ji cudayiyeke (istisna) tenê pêva, ponja ku di nivîs wara me da hatiye gotin dipiştîne (tyîd dike). Ev cudayî jî eve: Kurd ne ji ezbetên şehriyarên Îran in. Belkî şahînşahên Îran ji ezbetên Kurd in û paşê ev komel tevde navê gişkî, ano navê "Kurd", stendiye".
"Şehriyarên Îranê ji van birrên Kurdan bûn:
"Kiyûmersî : Kûtî" "Cemşîd : Kasî"
"Ferîdûn û paşhatiyên wî : Mannaî" "Hexamenşî : Kûtî-Amerdî-Kasî".

F- Wek hemî dîroknivîsan, min jî di ruvrswara xwe da ji bo dercîkirina Azdiyak ji Textê Keyan nivîsandibû. Lê, ez dê cardin binivîsînim: Belê, Azdiyak padîşahekî pir bedpaye û gewzeger (seflh) bû. Nesezayê text û tacê Keyaniyan bû. Loma, fermandaran û leşkeran - pir bi maf û pir bi cî - tevî rûs ipiyan , gel û tûde giş ustubarê niştimanparêziya xwe anî cî û Ixtovîko ji textê Keyaniyan dercî kir. Van niştimanparêzan Azdiyakê naseza ji text dercî kir û di ciyê wî da padîşahekî kurd û pirr seza, padîşahê Anzani-

- 263 -

yan, padîşahê KOtî- Amerdiyan ji ezbeta Texîxî- Xeniyan, Agirdad, Kûriş , Key Xusrewê Mezin li ser textê Kurd, li ser Textê Keyan rûnişt.and.

Niştimanparêzên Kurdan, generalên Kurdan, gewremerdên Kurdan li ser Textê Kurd, li ser Textê Keyan, yek Paris ne da rûnlştandin, ne karibû bidin rûnlştandin ! Eger Kûrtşê Mezin Paris bûya, Kurdê mêrxas, şerker 0 ciwanmerd gelo çawa ewê Parisekî carê şernekirî û cengnedîtî bianiya ser textê Kurdistanê? Kurd kengî pespayetiya weha pax dikir ?

Heredot ku pîrê dîrokzaniyê ye me pirsên wî li jor ne nivîsandin? Paris ne berbendên Pişdadlyan bûn? Ji Madan, Kilde 0 Asoran ra bac ne didan ?

Dîroknivîsê Parisan bi zexelî 0 sivikdestî ji şep 0 wesan behremend bûn 0 çawa xwe kir Piş dadî wusa jî Key Xusrewê Anzanî, Key Xusrewê Padîşahê KOtî- Amerdî kir Padîşahê Pasargadê 0 jê geriyan.

G - Dîroka Merdûx, derpêç 1, rûpel 171-172 : "Kurrê Key Lehrasep, Key Kiştaseb, di destpêkê da, wek bavê xwe, li Belxê Padîşahî kir. Paşê Paytextê xwe rakir bajarê Istexir (Persepolîs). 668-602 B.Z.".

"Key Behmen ji Hindistan ta Habeşistanê sînorê xwe fireh kir. Çawa ku di Ahdî Atîq, kitabî Esîr da eşkere nivîsiye, kişwerên bê jimar ferrnanfermabûna Key Behmen nivîsandiye: "Key Behmen bi dadkerî û şerdewerî (hikmet) nav blrlbû 0 ji bo xweşgerandina kişwerê xwe rêdarên hêja hevandibûn, Hevandin 0 rêzandina wan rêdaran ji Key Behmen ra navekî bilind û mezin dabû".

Şehriyariya Key Behmen ji 602 ta 533, ano 69 sal, ajot. Dîroka Merdûx, derpêç 1, rûpel 180 : "Bi her awayî dîroka hundir 0 derva wergerka Mad kirdarişek hundirî zanin".

"Mad ev wergerka ha bi destên xwe çê kir. Kurrê padîşah sezayê Textê şehriyariyê ne dît, ew rakir, li ciyê wî neviyê padîşah da rûniştandin. Hem ji vê
- 264-
guhartinê ra bi çavekî xistina Mad ne nihêrt û di hengama Daryus û Key Serxes da jî ji xwehermenda Kûriş ra xwehermenda Mad digot. Çawa ku li Tewratê di nivîs wara Azra, bend 6 da nivîsandî ye, ji paytextê Kûrtş ra paytextê kişwerê Mad gotine. Çi kişwerê Paris, çi jî kişwerê Paris û Mad gotine".
Ji dîroka Merdûx û zanişweriyên ku min derbasî jor kirin derjeyên han derdikevin : paytextê neviyê Key Kubbadê Kurd, Key Lehraseb, Belx bû. Key Kiştaseb, kurrê Lehraseb, Paytextê xwe rakire Istaxir, ano Kişwerê Paris, û li Istaxir 66 sal şehriyarî kir. Gava Key Kiştaseb mir jî, li Şîrazê hat veşartin. Wuha ye : B. z. Isa, di dora salên şeş sedî da, li van doran tu Padîşahê Paris tune bû, Paris berbendên Mad bûn. Eger ji Kişwerê Paris Padîşahek şehriyarî bikira, Key Kiştaseb li Istexir 66 salan Padîşahî nlkaribû bike û di mirina wî da jî Şîraz ne dihat veşartin.
Wuha ye. Van terraneyên han jî "Hexamenşiyan li Pasargadê, yaxut li Istexir, Padîşahî kir" efsane û nigaşên Eceman bûn. Wek efsane û nigaşên berê, çawa ku Ecem şehrlyariya Pişdadiyan klrlbû ya xwe!
H - Paşê, Key Behmen, ku kişwer û bajar ji Hindistanê ta Habeşistanê vekirandibûn û navê "Cihangîr" stendibû. di van hengaman da, ano dema ku Azdiyak dercî kir û Kûrtş kir Padîşahê Kurdan, Key Behmen li Suvêş (nêzîkî Bexdê) rûdinişt û şehriyarî dikir. Gelo çawa Key Behmen dihişt ku Paris ek bînin, li ser Textê Keyan bidin rûniştandln ?
Key Behmenê Madî, Key Behmenê Cihangîr tu caran Paris ek li ser Textê Keyan ne karibû bibîne, ne karibû rûmet.şkeniyeke evçend mezin bipezirîne !
Di gihaja Kûrlş da, bi rûpelan min nivîziş nivîsandin. Min ev nivîzişên xwe wek serêjeke (mesele) pir dijwar a "aljêbr" bi buxuşk (hesab) û pazend (kitab) û bi hoşrnêjî (mantiq) û bi awakî pevbend (muret.teb)
- 265 -

Û hevandî (munazzam) veçirand (hal kir) û ji hev derxist: Kûriş Kurd e, padîşahê Anzan e, padîşahê Kûtî- Amerdiyan e. Kurdan sezabûn û hêjabûna Kûrtş nas kir, ji paytextê Anzan, ji paytextê biçûk rakir, ew bir li ser textê gewre yê Hemedanê da rûniş tandin.
Kûriş bi xebtûkoşa xwe, 29 sal bi hoş û zîrekiya xwe, aşkart ku ew şayesteyê Padîşahiya Mad e.
Kûriş sînorên Kurdistanê fireh kirin, Lîdya û Hindistan vekirandin û navê mezinatî stend, bû Key Xusrewê Mezin.
Kûriş bi zanatî û bilindrewaniya xwe, bi dilovbanî û enzaperweriya xwe jî mezinbûna xwe nîşan da. Ordiya firazbaz Û navbilind a Kurdistanê gewretir Û xurttir kir.
Kûriş bi kirdiş aş kart ku padîşahiya Mad û padîşahiya Anzan yek tişt in. Her du jî Padîşahiyên Kurdistanê ne. Anzan jî Kurd e, Mad jî Kurd e.
Kûriş ji pismamên xwe yên Paris ra xweşdarî kir. Kûriş çêtirand ku Paris bi cotên xwe kariwer bibin û li konevanî û leşkerî têkil nebin.
Kûriş ji gelê xwe ra durust ma. 29 sal bi kamwerî şahinşahî kir û paşê gelê xwe û ordiya xwe ji kurrê xwe Key Kawûs ra spart û ji vê cihanê koç kir.
5- KEY DARA Y~ MEZIN Û KURR~ wt KEY SERXES Û DI VAN DEMAN DA "DASENDA KURD Û FARIS"
Key Xusrewê mezin bi xebtûkoşên xwe yên 29 salan pir qenc aş kart ku ew sezayê padîşahiya Mad bû û ew sezayê Tacê Kurdistanê bû. Key Xusrew yek deme ji bîr ne kir ku ew Padîşahê Kurdan e, Anzan perçeke Kurdistanê ye. Key Xusrew, ta mirina xwe, bi padîşahiya Mad serfiraz bû. Key Kawûs jî vî rewanê pak û vêrast ji xwe ra kiribû rêber. Bav jî û kur jî aş kart ku peyhatiyên Key
- 266-
Kubbad Û Key Aksar in. Wan her du jî ji bîra xwe dernexist ku girewa yegane ji bo parastina Kurdistanê ev ordiya pir şan û tab e, ev ordiya ku ji wan ra diyariya şehriyarên Keyaniyan e. Xwejber, wek Key Kubbadê Kurd, wek Key Aksar, di zanwerî, karûbar û bendûbestê ordiyên xwe da tu kêmanî ne hişt. Ordiya Kurdistanê bi fermandarên xwe û bi cengawerên xwe li ba van her du padîşahan wek roniyên çavên wan, wek kurrên wan bûn.

Ev her du padîşah berborên (slfetên baş) pesnwer ên Keyaniyan jî mlrhate girtibûn. Key Kubbadê Kurd bûbû avakerê mezin ê Kurdistanê. Key Tos bûbû avadankerê (mîmar) bajaran, pişternêrê cotkar, bazirgan û pîşeweran. Ji enzanîtiyê ra hinaweriya (ders) aştî û asayiş dabû, di kiş werê xwe yê fereh da ruyedadî (usulê muhakerne) vêrastiye û nûvandiye, ruyeyê dawe riya geroke (seyyar) nûvandiye û bi danîna rêdarên nûjen ji kurrên welêt ra dad û ewlemendî bexş kirine.
Kamweriya Key Aksar a mestir ev e ku ordiyeke fêris û firazbaz anî meydanê (41) û pê şahînşahiya Asorê zorba û şikencedar wenda kiriye. Ev Asor hezar û evçend sal xwîna kurd vexwar û yek roj ji Kurdan ra bîhn ne da.
Key Behmen û Key Xusrew weka ku hemdem in. Key Xusrew çawa ku ordiya Key Aksar û ruyeyên stratêjîk û taktîk ên wî mirate girtibûn, ewha jî ji Key Behmenê klşwergîrê Misr, ji dadkerî, şerdeweriyên (hlkemiyat) wî û ji rêdarên ku hevandibûn gelek hinave (ders) girtibûn.
Bi vî awayî, Kûrişê Mezin çiçend bi kişwergîriya xwe navûdeng stendibû, evçend jî bi zanişmendî û agahdariya xwe berguzîn bû û ji van pêşhatiyên xwe yên hêja û şanfiraz, ji aliyê cengawerî, şehrevanî û enzanparêzî, pir tişt hîn bûbûn.
Kûrlşê Mezin jî û kurrê wî Key Kawusê Kişwergîrê Misr jî xûy û berborên (adet) pêşhatlyên xwe yên
- 267-
pirfiraz : Key Kubbad, Key Tos, Key Aksar û Key Behmen, di riya rewşxweşî, enzanî, civatî û dadkeriyê da yek bihn ji şopa wan venegeriya. Wan kurdbûna xwe carê ji bîr ne kir, ordiya xwe ya gewre pirr evînand, ji fermandar, serceng, gerceng û leşker û cengaweran giştikî ra evîna biratî û dilovaniya bavîtî nîşan dida. Hergav bi karûbar, livbaz (talîm) û zîba tiya ordiyên xwe kariwer bûn. Ew ordî ku yegane pasevan û piştevanê Kurdistanê bû, ew ordî bitenê engîza rizgariya niştimanê Kurd bû.
Gelo Key Dara û kurê wî Key Serxes çawa bûn ? Ev her du Padîşah jî Anzanî bûn, Kûtî-Amerdî bûn, ji ezbeta Texîxî- Xenî (Exarnenî) bûn, padîşahbûna xwe ya kiş werê Mad divegehand (îtiraf dikir> lê ne dûrbîn bûn û dûrendîş

bûn, ne karibûn dûrûkûr bibînin. Xweşber, bav û kur yekbunyad ne bûn. Nemaza di aferişên wan ên gêndîtî (şexsî) da cudayiyeke mezin hebû.
Key Dara xwediyê du kêmaniyên mezin bû. Berî her tiştî pirgûman 0 bi wasrwas bû. A duyim jî, di şêtijî (qabiliyet) 0 zanedariya leşkerî ya xwe da ne sezawerê Text 0 Tacê Keyaniyan bû. Hemj, Dara ewçend ji payefirazî 0 cahşukûhiyê ra berxwar bû ku ziyankarî dida ji kenzineyê xwehermendê ra. Xuya ye ku gevzewier 0 şayîneger (sahibê zewq 0 kêf) bû Key Serxes - em dê paşê dûrûdirêj bibînin - bi kêrî tiştekî ne dihat, bitenê payexwaz bû 0 gewzemendîtî, meyxurî 0 dildadetî dikir.
Lê Key Dara li hemberî van kêmaniyên xwe tiştine hêja bire serî. Bi şêtijiyên hêja ji Kurdistan ra karkeriyên mezin kir : di kargerîniya kiş werî da, di aram 0 asûdeglya welêt da kamweriyên mezin bire serî. Jixwe dîrok ji vî Padîşahê Keyaniyan ra Od 0 sernavê "Mezin" loma daye, çima ku ew sazemendekî mezin 0 karkerînekî mezin bû.
Darayê Mezin çiçend di saz mendî 0 karkerînî da mezin bû, eger evçend jî di şerevanî û stratêjiyê da
- 268 -
mezin ba û padîşahekî rind dûrbîn ba, Kurdistan ne diket vî nirxê dilşewat û dilgudaz.
Wê gavê, çi Iskender, çi Ereb, çi jî Tirk û Mongol karibû Kurdistan wêran bikin. Di sala 521 B.Z. da, Darayê Mezin gava li textê Keyaniyan, li Textê Mad, li Textê Kurd rûnişt, di hundirê welêt û hin ciyan da tevdanî û serrakirin çê bûn. Dara ev serraklrln zû vemirandin. Lê, pey van tev heviyên biçûk du mîrên Mad jî ser rakirin. Van mîran padîşahên Anzaniyan li ser Textê Madan ne dixwestin, çavnebarî dikir û mafê xwe, mirîhatê xwe dixwestin. Ev der du mîr Çetertexme û Ferawertiş bûn. Min li ser van gertevan di nivîs wara xwe da dûr û dirêj nivîsiye, ducare nakim. Lê divê bi kurtebirî vêya bêjim : Dara ev herdu serrakiran bi hêsanî beralî ne kirin. Sê caran li bin fermandarên xwe yên Ermenî sipah şandin û her sê caran jî sipahên Dara şikiyan. Cara çaran Dara bixwe sed hezaran leşker kişandin ser her du mîran.
Çetertexme di meydana cengê da hate kuştin. Ferawertiş bi birîndarî hat girtin. Dara ew anî Hemedanê û ew bi işkence kuşt.

Van serraklrlnên her du Mîrên Madan Dara ku pirgûman û wasiwas bû xist dil aş if tî, dilkutî û endîşeke mezin. Êdî ji Tac û Textê xwe pêva li tiştekî din bîrdarî ne dikir. Ji vir pêda ji Mîrên Kurdan û ta ji gişên Kurdan tirsiya, veciniqî, dilreş bû. Dara çare û endizeke yegane ji xwe ra dît :
Kurd ji saraya xwe û ji ordiya xwe dûr xistin. Saraya xwe û ordiya xwe ji biyaniyên bi dirav kirîn û tije kirin. Ji tunebûna dûrendişî, ji çewtşînasiya Darayê mezin, seray û ordiya Keyan kete destê Parisan û Biyaniyan. Ev Parisên ku carê bi karûkoşên xwehermendî, leşkerî û konevanî karrwer ne bûbûn li saraya Keyaniyan piçikîn û xurtî û tebûtiya Keyaniyan hatin ji bîr kirin. Ordiya Keyanî bicarek ji meydanê, li ciyê ordiya fêris û firazbaz a Keyaniyan komeleke Enzanên Paris ên pepûk û nizmpaye û biyaniyên dirav kirî û kurtêlxur peyda bû.
- 269-
Derjêya vê gerwera (hal) pirendûh Û purxun di 12 Êlûn, 490 B.Z. dagihîşte şermsariya "Maraton".
Di van geşteceng û şeran da, Mardonyosê biyanî û zavayê Dara serlekşerê ordiya Darayê Mezin bû ! Eva, di hengama Darayê Mezin da, bi piçikandin û kombûna Parlsên cotkar û şivan saraya Keyaniyan, "dasenda Kurd û Paris", gihîşte vê rûreşî û tahlayiya hanê!
Em werin çîroka Key Serxes : pey şkestina şermsar a Maraton, Dara wehirand (qerar da) ku ew bixwe serleşkeriya ordiya xwe bike û ji bo vî şerê mandê (musteqbel) bê rawestan 0. bê bîhndan amandişeke (lhzarat) zor kir. Lê temenê Dara jê ra rê ne da. B.Z. 487.
Key Serxes amandişên bavê xwe - çawa ku bi awakî pejilandî min di nivîs wara xwe da nivîsandiye - tûmandln (Ikmal kirin} û ji reşayî 0. ji deryayê dirêjî Yewnanistanê kir. Lê, çi sûd ! Ordiya Key Serxes ji ya Dara şerpezetir û perîşantir bû û reviya. Piraniya leşker û fermandarên wî bi diravan, ji heftê û du gelan û ji Parisên jar û pepûk berbihev hatibû û bê werzwerî, bê zanwerî, bê xweziş û bê armanc bû.
Key Serxes ji textekodan (kelek) li Geliyê Çanakkale pirek dabû çê kirin, li pêşiya Ordiya xwe ya milyon bi flrazdarî ji geliyê Çanakkale derbas bû. Key Serxes ne haydar, nezan û bê azmayiş (tecrube), ji karûbarên kiş werî û leşkerî bê agah, pirumîd, pirgewz û xwedîtî bû.

Gava Key Serxes ji geliyê Çanakkale derbas bû 0. dirêjî Yewnaniyan kir keştîcengên wî yên pirjimar û pir xurt jî ji Deryayê Egê dûr ketin û berê xwe da Deryayê Yewnanistanê. Çawa ku we di nivîswara min da xwend, li tengava Salamînê û li ber çavê Key Serxesê gerdenfiraz (maxrûr) keştîcengên wî bi awakî xwînî û hovnak şkestin û bi perîşanî reviyan. Key Serxes, pey temaşakirina vê şkestinê û

- 270-

şûnbextiya (mexlûbiyet) tahl Û şermwer, tavil tevî ordiya xwe reviya, çû welatê xwe. Paşê, ta mirina xwe - hêj rastî jardadayîna xwe - ji aliyê fermandarê ordiya bendewar Artabanos di Sarayê Suz da bi meyxurî, saz û hayûhuy gewzendetî kir. B.Z. 465.

Me li jor xwend : Mardonyosê biyanî yê Ûrim zavayê, Darayê mezin, çawa ku di şerê Maratonê da serleşkerê mezin bû, cardin di şerê Salamînê da jî serleşkerê serleşkeran bû !

Key Serxes gava ji Yewnanistanê reviya, Mardonyosê zava yê serleşker bi 300.000 cengawer li Yewnanistanê hiştin. Mardonyos serê buharê dirêjî Yewnaniyan kir, di şerê Pêlatê da, di meydana cengê da, hat kuştin. Ordiya pejmurde ya Key Serxes, ku navê ordiya Keyaniyan lê bû û bi sed hezaran bû, li pêşberê çend qehremanên yewnanî reviyan ! Ên berşûrmayî suwarî keştiyan bûn, bi şermsarî û rûreşî bazda ! Li kenarê Deryayê Egê, li hindava Mîqal, şerekî din kiribû û ordiya Key Serxes cara duduya jî şikiya.

Hezaran efsûs ! Ev ordî, ordiya Kurdistanê bû ! Navê bilind ê Kurd lê bû ! Ew ordî ji Parisan, ji biyaniyan berbihev hatibû, se.leşker û fermandarê wî jî biyanî bûn ! Ev ordiya heftê reng û sedreng ku li ber Yewnaniyan ranewestiya û di reşayî û deryayê da şkest nabedîd û nabûd bû !

Di heng ama Key Serxesê gewzende û gewende da eva "dasenda Kurd û Paris" ! We dît? Bi tevbûna Paris li karê mêran, li karê Kurdan, çi rûreşî çê bû? Ordiya Keyanan, ordiya Kurdistanê, çiçend serfiraz bû ? Çawa gihîşte şan û şukuhan ?

Yewnaniyan hêj wê gavê, ano berî 2450 sal, ji van şeran ra : Maraton, Salamîn, Mîqal ... şerên reşayî, şerên deryayî, şerên "Mad û Yewnanan" gotibûn. Dîroknivîsên wan jî "şerên Madî" nivîsîbûn. îro jî di nivîs wa rên

dîrokên Cihanê gişî da navê van şeran "şerên Mad û Yewnan" hatine nivîsandin.
', 271 -
Elbet, Yewnaniyên wê gavê zanibû li peşiya wan kîjan padîşah heye, kîjan gel heye, bî kê ra şer dikir. Eger li pêşiya wan Padîşahê Paris, gelê Paris heba, "şerê Paris û Yewnan" dê binivîsandana. Yewnaniyan çi dît, ew nivîsand û rastî got (42).
Yewnaniyên kevn ku di zanişwerî û hunerweriyê da mamostayên "enzanî" yên îro ne, neyarên ku di hemberê wan da şer dike gelo dibe ku nizanibin kî ye ? Ev vêrasteke eşkere ye. Ji bo vêya ji dudiliyê ra engîz tune.
Darayê Mezin û Key Serxes Mad bûn, Padîşahên Madan bûn, ne Paris bûn û ne Padîşahên Paris an bûn. Vêrastiya hanê her du Padîşah jî bi eşkeretî pezirandiye.
Heredot di 484 B.Z da za û di 425 da mir. Key Serxes jî di 484 da li ser Text rûniştibû. Di 465 da Artabanos ew jardadayî kiribû. Seyaheta Heredot li Paris berî mirina Key Serxes bi bîst sal e. Ano, gava ku Heredot çûbû Paris, Kûrişê Mezin 120 sal berî vê çûnê padîşahî kiribû û her sê paşhatiyên wî - Key Kawus, Key Dara, Key Serxes - jî li dû hev padîşahî kiribû. Cihan giş zane ku ev Padîşah kişwergîrên gîtî ne. Eger ev her çar padîşah Paris bûna. jixwe Heredot ji vê kissê divê agahdar ba û ev padîşah di nivîs wara xwe da dê padîşahên Paris binivîsanda. Heredot çima ji Parisan ra bi awakî sade wuha dibêje : "Paris carna bi serê xwe bûne. lê pir caran destbendên Pişdadiyan bûn û bac dida xwehermendên Mad, Asor û Kildan" ? Çawa bûye ku Parisan ji van padîşahên fêris û cihangîr yek pirs ji Heredot ra ne gotine ? Eger Kûrişê Mezin û Darayê Mezin padîşahên Paris bûna Heredot dê nebihîsta ?
Xuyaye ku berî 2300 sal, gava Heredot çûbû nav Parisan, wan di van hengaman da hînê derew û lîzbazî ne bûbûn, li xwe dananîbû û padîşahên ku neyên wan bûn ji Heredot ra ne gotibûn padîşahên me ne û bi derewan ew ne xapand.
- 272-

Pey jehlrandina Key Serxes bi destê fermandarê ordiya bendewar, ji Anzaniyan çar padîşahên din li ser Textê Keyan rûniştin. Paş van padîşahiyên han, Darayê sêyim di sala 351 B.Z. da li ser Textê Keyan rûnişt. Ji Darayê sêyim ra Key Darayê Madî dibêjin. Ji ezbeta Key Kubbadê Kurd e, neviyê Keybanû Humay e.
Key Darayê Madî xebatkar bû, çakdilxwaz bû û dûrendîş bû. Çi sûd ! Ordiya ku ji Darayê Mezin jê ra mîrate mabû, ordiya biyaniyan bû !
Key Darayê Madî li deşta Erbîlê bi Iskenderê Mezin ra şer kir. hat kuştin. Ordiya wî şkest. Iskender Kurdistan seraser leyand ! Kurd jî, Faris jî, giş bûn dîlên berdestên Iskender !
Eva "Dasenda Kurd û Faris" di hengama Key Darayê Mezin û peyhatiyên wî ku 190 sal ajot da. Ji sûc, guneh û vajên (xeta) Darayê yekim Kurdistan gihîşt çi sermsarî û çi encameke cigersûz !
Min li alîkî xebtûkoş û şanûşukuhên Kurdan ên 6.000 sale bi kurtebirî berbend kirin. Li aliyê din jî min roşimana (hal> Parlsên blçûçlk, pismanên Kurdan, berbend kir. Ew, ano Faris, pey bicîbûna Kurdan li Mezopotamyayê 2.000 sal bi şûnda li kenarê tengava Faris peyda bane. Q paşê, min ev her du pismaman bi hev berendizandin (muqayese) û [êdera berendizî ya min hîç jî ji bo Farisan qenc derneket!
Niha, hin pirsiyarên din tên bîra min. Ez dixwazim ji pismamên Kurdan, ji Farisan bipirsim : gelo han jî hay ji xwe heban ? Gelo we roşmana xwe ya qels û pepûk zanibû ? Gelo we zanibû pismamên we yên Kurd di nav 6.000 salan da çi xwîn rijand ? Çi cefa kişand ? Çi mêranî û canfeşanî kirin ? Hîç tiştine wusa ji we ra dan fehimandin ? We ji bo van pismamên qehreman - ku hûn îro wan pir belengaz û naçîz dibînin - di nivîswarên xwe da tiştek xwendiye? Gelo han pê zanin? Kurdistana
- 273 -
rengîn ku îro bi stemkerî û îşkence di navbera çar xwehermendên misilman - Iran, Iraq, Sûriya, Tirkiye - da bi qîma dilan hatiye perçe kirin di çi roşiman û bûnişên purxun û dllgudaz da ye ? Gelo we hîç bihîstiye ? Ev pismamê we yê kevnare û gewregurz (muazzam) ku ji mêj ve li ser ruyê erd xwehermendên girsegir, imparatoriyên gerraze sazandiye û şehreyarî, şahînşahî, padîşah, cihangîr û qehreman gihandine ? Ku xudan

avayî, avadanî, şehrevaniyên zîwer û ziba bû ? Q ku di zanişmendî, hunerwerî, pîşeweriyê da pir pêş ve çûbû ?
Lê çi sûd ! Ev Kurdê çeleng û zîwer, ev Kurdê zîrek û hêja, ev Kurdê mêrxas û cengawer îro çend sal e ku bi yekdestiyên zorbatî, barbarî û xwînxwarî yên van her çar xwehermendên misilman di nezaniyê da, di nezaniyeke kûr û reş û tarî da maye ! !
Gelo we carê ev bedbextiya pismamê xwe yê Kurd bihîstibû ? Ev her çar xwehrmendên misilman dixwazin ku vi gelê cuwanmerdtir, kevnaretir û hêjatirî gişî di bêdadiyê da, di nezaniyê da bihêlin û vî Kurdî hunda bikin ! !
Q cardin pirsiyareke din tê bîra min : li Ecemistana berê û Îrana îro, ji dema ku sazmaniya debistan û medresan dest pê kir, gelo Ecem, yaxud Iran, ji bo pismamê xwe yê Kurd tu tiştekî nivîsî? Ji mezinatiya Kurd, ji gernasiya bêtabker (şehameta îcazkar) a Kurd, ji kirdariya dijmin ko pa Kurd, û ji rlngî (met.anet) , flrehbînî, girbarî (tehemmul), xurtî, mêrxasî, dijminkujiya Kurd, û ji şehrevanî, zanişmendî, hunerdarî, pîşeweriya Kurd gelo we du gotin, du pirs nivîsandin ? An bitenê hertiştê Kurd, dîroka Kurd, şerevaniya Kurd, qehremaniya, bajargîriya Kurd, dilovaniya Kurd, mihrivaniya Kurd bi lîzbazî û bi destcerbî (elçabûqlixi) we kir ji xwe ra, ji Faris ra ? Q ji nav vî karî - pak û paqij - bi hêsanî derketin û paşê jî we navê xwe danî "Pursî Qedîm" ? !!
- 274-
Xwejber, ez ji berî da zanim ku bersivên pirsiyarên min nawer (rnenfî) in, û ez pir baş zanim ku îro li çar nekarên cihanê bi sed hezaran, hatta bi milyonan nivîskarên dîrokan dastê (mal) Kurd, mafê Kurd, dîroka Kurd û hebûna Kurd kirine das tê Faris û ser navê Faris nivîsîne ! ! Ereb "Fursî qedîm" gotine. Tirk "eskî Faris" gotine. Awrûpayî jî "ancienne Perse" gotine, xwe jê pak kirine! !
Meriv kare dîroknivîsên Ereb, Ecem û Tirk bimerzine (mazûr), çima ku ev xwehermendên misilman zorba û despot in. Gel û tûde , zana û nezan, piçûk û mezin giş bendeyên van despot, stemker û bêwicdanan in ! Lê zanayên Awrupa ? Vana çawa maf û vêrast û rastiyê ne dîtin ? Eger

dîtibin, maf û rastiyê ji bo çi ji hemû cihanê ra ne da nas kirin ? !! Bi rastî, ev tişt pir sosretwer û şigeftwer e ! !
Van dîroknivîsên Awrûpayî ma hîç carek nivîsandinên zana û arkêologên ku - wek wana - Awrûpayî ne ne xwendin ? Van dîroknivîs an bira carek li herşe (xerîte) binêrin ! Lê herşeyên bê zexelî, bê vir û çewtî!
Ev kiş werê gerraze (pir fireh) ku jê ra bi sedsalan Ecemistan gotin, anha jî navê wî kirine îran, bi rastî bi destê Farisan hat meydanê ? Faris bi Sûmîr, Akad, Elam, Kildan, Asor, Hind, Hitît, Misr, Pont, Kapadokya, Lîdya, Yewnan, Roma ... ra ceng kiribû ? Şeş hezar sal, ma Faris xerpişî ? Bi van gel û hawişên rengbireng ra gelo kê danûstendinê kir ? Ên ku bi şehrevaniyên gûnazgûn mizişîn (temas), şeş hezar sal xerpişîn, koşiyan, bazda, perpitîn û gellek azmayişan (tecrube) dîtin ma kî bûn ? Faris bûn ? Elbet ku na !
Lê, gelo Faris çigav û çawa ev sextekariya ha berbihev anî ? Faris bi çi awayî ev şep xiste destê xwe ? Ez dê bersîvên van pirsiyaran di benda "Leyandina Kurdistan bi destê Ereban" da bidim.
- 275 -
6- HENGAMA SELEFKE (S~LOKOS) Û "DASENDA KURD Û FARIS"
Pey mirina Iskenderê Mezin, kişwerên gerraz ku wî vekirandibûn di navbera sê generalên wî da hatin par kirin. B.Z. 312.
Kurdistan bû para Selekos. Lê, xwehermenda ku Selekos li Kurdistanê sazand dûrûdirêj paydar ne bû. Di sala 255 B.Z. da, ano 57 sal pey hatina Selekos, li Kurdistana navîn, Kurdan "Xwehermenda Mad" serrast kir. Di sala 225 B.Z. da, "Xwehermenda Aşkaniyan" hat meydanê. Wuha ye. Xwehermenda Se lefkiyan a Ûriman ji 87 sal bêtir li Kurdistanê paydarî ne kir.
Ez li vir, ji bo Selefkiyan tiştek nanivîsînim. Camêrkesên dilxwaz karin nivîs wara min bixwînin. Tenê, di dema şerên Selefkiyan da, ez dê li "Dasenda Kurd û Faris" bigerim. Padîşahên Anzanî, Darayê yekim û kurê wî Serxes û peyhatiyên wan, li serayên Sûz û Babîl û Istexir ji tovrindên (esîlzade) Farisan weşbest, sazende û nazenîn, general. fermandar û bergeştmendên (rnuşawir) biyaniyan tije kiribûn. Ev du sed salên

"meyxurî û dilbazî" ji bo Farisan rojên gewzûşadî bûn ! Roj rojên Farisan bûn ! !
Xwejber, Kurdên paknejad ji van civanokên gewzendegî û genîwerî dûr reviyabûn. Kurd li benda roja giran, roja kurê bavan bûn.
Darayê Madî, Darayê bedbext, gava hat ser Text, xwejber ev gurûhên sarayê , tev ên tovrindan, weşbest 0. kurtelxuran giş, wek sûsikan belabela bûn!
Min bertir jî got.ibû : hawişê Faris şer û pevçûnê ne dievînandin. Gewz û asûdegî 0. tenperweriyê diçêtirandin. Loma, gava şer dest pê kir, ew ji ber çavan hunda bûn, ketin qulûmilan ! Lê. dema ku Selekos xwehermenda Selefkiyan sazand, ev aqayên Ecem derketin meydanê, bi konetî, bi tekapû xwe gihand Selefkiyan !
- 276-
Lê, tevgera Kurdan, tevgera kurê bavan, bi awakî din bû ! Van kurên qehremanan, pey gerteva dilkuj û şermsar 0 ya rûreşî ya Hewlêrê (Erbîl), hêj berî mirina Iskender, rahişt gurz 0 şOran, xencer 0 tîran.
Ji bajarên mezin, ji rêbuharên ordiyan pêva li deverên din ên Kurdistanê, ji sînorê Hindistan ta çemê Halis (KIzilirmak), li her aliyê Kurdistanê Kurdên behadir 0 dilîr birrên canbêzar serrast kirin, bi şevxwînan, bi dorpêçan, bi rêbirrîn 0 bi êrîşan, bi şev 0 roj leşkerên Ûrtman, leşkerên Iskender êşandin, westandin, tu aram ji wan ra ne da.
Mîrên Kurdan ji alîkî bi canbêzarên sivik 0 çalak 0 wek gurên devbixwîn Ûrim dikopandin, diêşandin, 0 ji alîkî jî, ji bo manda Kurdistanê, ji bo vegerandina serxwebûna Kurdistanê bernave 0 projeyên bergiran bi awakî fireh disazandin.
Li dawiyê, wan ordiyên Ilrtman şikandin. Kurd di 255'an da di nîveka Kurdistanê da, bingeha xwehermendeke serbixwe danî. Paşê, sî sal bi şûnda, di 225 B.Z. da, ji ezbeta Key Kubbadê Kurd, neviyê Key Darayê Madî, Aşek ala şorişa serxwebûnî rakir. Kurdên ku karibûn rahêlin gurz 0 xencer 0 çekan, giş bi hev ra, kişiyan ber bi gaziya rehaxwaz 0 şorlşger, Aşekê Madî !

Aşekê (Arşak) pehlewan ordiyên Ûrtman şikandin. Kurdistan bi germaweriya (himmet) kurên xwe yên dilîr 0 hêja ji nû da gihîşt serxwebûn 0 azadiya xwe.
Di van hengaman da, di van rojên ceng 0 kuştinê da, di roja kurê bavan da, gelo tevgera kurikên Ecem ên me çi bû ? Hergav çawa bO, cardin ewha bû ! Ecem dilopek xwîn ne rijand 0 ji qulika xwe der ne ket ! Ji gewza xwe bi şûnda ne ma ! !
- 277-
Eva ! Di hengama Selefkiyan da û di hengama danîna Aşek bingeha xwehermenda Aşkaniyan da "Dasenda Kurd û Faris".
Lê, pey gellek sedsalan bi şûnda, gava Faris rabûn ji xwe ra dîrok binivîsînin, ev qehremaniyên Kurdan, xwînfeşaniyên Kurdan, ev şerên dijwar û xwînrêj ên Kurdan kirin ên Farisan ! !
Çawa ku Eceman Pişdadî û Keyanî kiribûn bermewên xwînfeşaniya xwe, Aşkanî ku Aşekê Kurd bi xwîna Kurdan anîbûn meydanê cardin kirin dastê Eceman Û bi navê xanedana sêyim a şehriyariyên Eceman bi dîroka xwe va nivîsîn ! !
7 - DI HENGAMA SASANIYAN DA
"DASENDA KURD Û FARIS"
Erdeşîrê Babekî di sala 226 P.Z. da xwehermenda Aşkaniyan wergerand, bi navê bavê xwe Sasan xwehermenda Kurd a Sasaniyan sazand.
Sasan ji ezbeta Behmenê cihangîr e. Wuha ye. Erdeşîr neviyê van Kurdên Qehreman e Û Kurd e Û kişwerê ku ferweraniya wî dike Kurdistan e. Usa ye. Çawa gûman tê li ser kurdbûna xwehermenda Sasaniyan ? (43). (44). (45)-
Lê Ecem, bê fedî û şerm, Sasanî jî kirine malbata çarim û li dîroka xwe nivîsîne !
Yezdê Kurd, şehriyarê bedbext ê Sasaniyan ê dawîn, di 656 P.Z. da bi ordiyên Omer Ibn Xettab ra ceng kir, şikiya, hat kuştin. Erebê xwas û rût Kurdistana ava û firawan û gumreh û bextiyar leyand û xist bin destê xwe. Bilêc (qet.Iiam), talan, agir, şikenc û barbarî, paymala namûs ... Kurdistan seraser bû wêranezar û kambax! !

Kurdan, pey şerên Qadisiye û Nihawend, çekên xwe ji dest berdan, ceng û pevçûnên xwe demandin. Di pir ciyan da, şerên Kurd û Ereban sî sal dirêj

- 278 -

kirin. Kurdan, ji bo ola xwe ya homanwer, ji bo nişimanê xwe yê şêrîn û pirfiraz û buhadar, ji bo namûs û rûmet û navê xwe şer kir. Kurd mirinê ji dîlketinê çêtirand.

Eger hûn pirsiyara Farisan dikin? Xwejber, Farisan xuya xwe ya şîrîn ji dest berneda ! ! Tavil bûn misilman û ketin quncik û qulikan û bi gewz û jîniş demxweş bûn ! ! (46). Eva ! Di hengama Sasaniyan da "Dasenda Kurd û Faris".

8 DI HENGAMA LEY ANDINA EREBAN DA "DASENDA KURD Û FARIS"

Di sala 637 P .Z. da, Omer Ibn Xettab imparatoriya pirtab û pirşanfiraz, şehriyariya Kûtî û Kurtiyan, hunda kir, şahînşahên wê kuştin û paş sê salan, ano di 659 da, ji nû da du ordî şandin ser Kurdistanê.

Faris hêj berî sê salan bûbûn islam û "eger xuahî selamet der kenaret" gotibû û kişlyabûn quncikekê û rûniştibûn. Lê, Kurdên mêrxas li ola xwe ya kevnare durustbext (sadiq) mabûn, ola Islamê ne pezirandibû. Kurdan çi ji Omer perwa dikir, çi ji mirin ! Yek ustubarê Kurdan hebû : parastin û qedxenkirina Kurdistan !

Di nivîs wara min da, li ser kissa leyandina Ereban min têra xwe nivîsandiye. Cardin li ser vê gerteva dilkuj û rûreşî çi binivîsînim !

Di van şeran da Kurd şikiyan. Ordiya Omer Ibn Xettab Kurdistan seraser da ber lingê xwe. Bêdadî, barbarî, rûreşî û ruswatiya ku Ereban li Kurdistanê kir tu caran û li tu ciyan çê ne bûne ! !

Pey Omer Emewî hatin ser kar. Ev bêdadî, ev rûreşî û ruswatî nêzîkê sed sal dirêj kir !

Çawa ku we di nivîs wara min da bi awakî pejilandî xwend, cardin qehremanekî Kurd derket meydanê ! Ev qehremanê rehakar Eba Muslimê Xoresanî bû !

- 279-

Eba Muslimê Xoresanî Kurd, nişstimanê Kurdan, hemj Faris û kurên Hezretî Elî, ji barbarî û stemkariya Emewiyan reha kirin û xelîfetiya Abbasiyan sazand.
Emperyalîzma Ereban, ku 1350 sal berî hîngî hat meydanê, bê gûman bi awakî hovnak û stemkertirê "Nazîsm û Faşîsm" bû ! Nemaza di hengama Omer Ibn Xettab û Emewiyan da, ku sed sal bêtir demand, ji agirê Dojeyê dijwartir bû ! Nîvê kesên Kurdistanê bllêc kir, bi milyonan keç û bûkên nazenîn ên Kurdan talan kirin. Di bajaran da pazendgeh û nivîswergeh şewitandin ! Ev kenzên bêbuha bûn arî!
Kurdên ku ji êrîşên Ereb ra bi dijwarî wergerştibû, Ereb ji bo wan enirîbûn ! Loma, ji bo Kurdan her celeb êş û stem û şikence destûre bû. Eger qehremanek wek Eba Muslim dernehata, îroj li cihanê Kurd tu nebû!
Faris ji vê hengamê ji destê Ereban bi bişa (nisbet) Kurdan pir siviktir derket ! Faris ne serhişk bû ! X we ne êşand ! Lezûbez bû misilman ! Xwîna xwe ne rijand ! Şadiman û xurrem rûnişt ! (47) Nemaza gava bi sîdariya Eba Muslimê Xoresanî yê Kurd li Bexdê xelîfetiya Abbasiyan sazimend bû, û pey gelek salan bi şûnda zimanê Farisan li der û beran xuya bû dereng dereng farisî bû zimanê nivîzrşê: û paşê, gava ku Şêx Ismaîl bi camêriya murîdên xwe yên Kurd bû Şah Ismaîl, şehriyariya Sefewiyan sazimend kir, Farisî kir zimanêfermwer (resmî). Berî van deman, zimanê Faris bitenê zimanê dora Şîrazê bû. Rind xuya dibe ku Faris bi camê riya pismamên xwe yên Kurd bi hêsanî bûn xudan ziman. Lê, em baş zanin. li roja ceng û kuştinê Farisek ne çû gaziya Eba Muslim û dilopek xwîna Faris ne rijiya !
Lê zimanê Kurdan, ji mêj va, ji hezaran salan va, ji Belxê ta Iskenderonê zimanê gişkî bû. Ji hengama Padîşah Kandij, Padîşah Yezdê Kurd ê bedbext, di vî kişwerê fêris da zimanê gişkî kurdî bû. Belê, ev

ziman çawa zimanê gişkî bû, usa jî zimanê fermwer bû. Di sarayên Pişdadiyan, Keyaniyan, Aşkaniyan, Sasaniyan da kurdî zimanê fermwer bû. Çawa ku nlvîswarên dîrokan ruvisme, "Awîsta" pazendê Zerdeşt jî kurdî ye, nivîzişên Key Darayê Mezin li Bih-Sutûnê jî kurdî ye. Nameya Şehir-Banû Xatûn ku ji bavê xwe ra, ji şehriyarê bedbext ê Sasaniyan ra, ji Yezdê Kurd ra nivîsiye cardin kurdî ye.

Hezaran esef ! Zimanê Kurdan ê xweşaheng û xurt û şêrînsaz û pir suda bi leyandina Ereban hunda bû û zimanê Farisan bi erzanî kete şûnê ! ! Eva di hengama leyandina Ereban da "Dasenda Kurd û Faris".

9- VEKIRANDINA BEXDA Û HUNDABÛNA ABBASIY AN BI DESTE: HULAGU ŞEHRIY ARIY A SEFEWIYAN

DîLBÛNA KURDAN LI BIN DEST!: TIRKAN Û "DASENDA KURD Û FARIS"

Di hengama Abbasiyan da Kurdan û Farisan hinek bîna xwe stend. Ji Kurd û Farisan pir kes gihîştin diyarciyan. Hem], Kurd di gellek ciyan da bûn xudan mîrî. xanî, padîşahî û şehriyarî. Van xanedanên Kurd ên serbixwe li çar nikarên Kurdistanê bê jimar dej, kel, singer, bircûbarû û şato ava kirin.

Di sedsala yazdeyim da, Tirkan. Tataran û Tirkmenan ber bi Kurdistanê dirêj kir. Van leyandinên Tirk û Tataran ji çar sed sal bêtir ajot. Kurdan, bi sîdariya van dej û singer û şatoyan, bi erzanî - çiçend ku ji destê wan hat - ji destê koçerên talanker xwe rizgar kir.

Ziyan, kul û derdên ku Kurd û Faris ji destên van kulîkêzên talanker dîtin pir giran û pir dijwar in. Eger Ereban bi behana belavkirina ola islamê emperyalîzma "ûrûbe" ne ajotana û imperatoriya Kurdan hilneweşandana, eger ola islamê wek mesîhl-

yên îro bi dilovanî û nermî û mihrivanî, bi şîret û bi şorindan belav bikirana, şûrê xwe nekişandana, Kurdan bilêc nekirana, Kurdistan, ku çend hezar sal wek bendek ji polad û mlfriq li ber êrîş 0. leyiyên Tirk 0. Tataran sekinîbû, ew dê weke her gav ustubarê xwe yê girsegir 0. bergiran bidemanda û wêrankirina cihanê ji van kulîkêzên Mongol wê dê ni dar bikira.

Omer Ibn Xettab ev dûrbînî bîr ne bir, fahm ne kir. Emperyalîzma "ûrûbe" ber çavê Omer reş kiribû ! Derjeya wî çi bO. ? Kurên Mongolan ji alîkî gihîştin sînorê Hebeşistanê, Meke, Medîne 0. bajarên Qureyş vekirandin, ji aliyê din xwe gihand bedenên Viyana, Bîzans, Bulgar, Sirb, Yewnan ... dan ber lingên xwe, di xwîn 0. agir da feşirandin. Tugrulan, Alpan, Kihçan, Cengîzan, Hulaguyan, Kayhanan, Tîmûran, Karan, Akan cihan grşr şewitand, kizirand. Sed milyon Ereb bi sedsalan bûn dîlên Tirkan! !

Ez Ereban dipitinim (tenqîd). Serzinişa min, gazina min ji Farisan e. Eger pismamên Kurdan, Farisan, jî wek pismamên xwe yên Kurd ji ceng il şeran ra kêrhatî û jêhatî bûna, 0. wek Kurdan rahiştana gurz û xencer 0. şûran, dirêjî Ereban bikirana, yek ji van bobelatan ne dihat serê Kurd û Faris.
Belê kak Ecem ! Tu ne mertalgêr î 0. şûrhingêv î ! Şer 0. ceng naevînî ! Lê paşê, gava dest bi nivîsandina dîrokan dikî, dibî birincî ûsta (ostayê yekim), şehriyarên Kurdan, cihangîrên Kurdan, kurên qehremanan 0. dilawerên Kurdan dikî yên xwe û li ser navê xwe dinivîsînî ! Di lîzên destan da, slvikbaz î, hunerbaz î ! !
BINGEHDANîNA PADîşAHIYA SEFEWIYAN Q "DAsENDA KURD Q FARIS"
Neviyê Cengîz Xan, Hulagu Xan, di 1258 P.Z. da
- 282 -
Bexdê vesend, xelîfe kuşt, bajar talan kir û paşê bilêc kir.
Hulagu Xan ji Hindistan ta Deryayê Reş, di vî kişwerê fireh da, ano di Kurdistana kevnare da, bi navê Alhaniyan imparatoriyeke fêris sazand. Lê Hulagu pir ne ma, heft sal bi şûnda mir, çû dojehê. Imparatoriya Alhaniyan jî di nav çend salan da hunda bû.
Pey van deman, li Kurdistanê, li dora Geylanê, ji ezbeta Hezretê Alî, Şêx Ismaîl, Şêxê Neqşbendiyan, kurê Şêx Sefaeddîn hebû. Şêx Ismaîl murîdên xwe yên Kurd da dora xwe û dirêjî Gurcistanê kir, bajarê Şerwan ji Gurciyan stend.
Di nav çend salan da, Tebrîz, Xoresan, Hemedan, Bexda, Diyarbekir û Mereş, ev bajarên Kurdistanê, vesendin. Di sala 1500 da, Tebrîz ji xwe ra kire paytext û serxwebûna xwe bang da. Şêx Ismaîl di nav çend salan da Mardîn, Mûsil, Kirmanşah û Bedlîs jî stendin û bû Şah Ismaîl.
Gava Şah Ismaîl bi vî awayî gellek ciyên Kurdistanê ji Tirk û Tirkmenan deranîn, di van şerran da gellek Kurd û mîrên Kurdan di bin ala wî da canfeşanî dikir. Kurd ku ji hezar sal vir da şehriyarî û serxwebûna xwe hunda kiribûn û res teyê (muhtac) aştiyê bû û dilxwazê dadmendî û mihrivaniyê bû, jê ra wer bawermendî hatibû ku eger li dora Şah Ismaîl, kurê Hezretê Alî, xwe bide hev, yekîtiya Kurdistanê dê bê meydanê û Kurd tiştên xwe yên hundabûyî dê bigihîne destê xwe. Loma, Kurdan giş xwe da dora şahê xwe yê nû û ji her fermana wî ra ji dil û can serfurû bûn.

Pir muxabin ! Gava Şah Ismaîl kiş werê xwe fireh kir û xurtir û tuwangertir bû, riya rast, riya biratiyê hunda kir û kete riya xwebînî û gerdenfiraziyê. Q li dora Şah Ismaîl hin gewremerd û bergeştmendên ne Kurd û bedxwaz peyda bûn, çewtşîret danê û ew xapand. Şah Ismaîl tevgera xwe guhart, bi

- 283 -

rruren Kurdan ra dest bi dasendê kir, leşkerê xwe kişand ser mîrên Sinendej û Kirmanşah, ev her du mîr şikandin û kîşwerên mîrate yên bav û kalên wan ji wan stendin. Ev kirdartyên Şah Ismaîl ne bes bûn, rabû rêola "Şî'e" jî kire rêola fermwer ! Van her du çewtriyên mezin ên Şah Ismaîl mîrên Kurdan jê dûr xistin. Mîrên Kurd ji Şah Ismaîl sar bûn û jê reviyan.

Yavuz Sultan Selîm, Padîşahê Osmaniyan, ev nahenga (nifaq) Şah Ismaîl û mîrên Kurdan wek firawaniyeke azmanî dît û ji vê şepê behremend bû. Bi alîkariya Melle Idrîsê Bedlîsî mîrên Kurdan ber bi xwe anîn û li xwe bend kirin. Kurd û Tirk bûn yekdest û peyman nave navişandin.

Van her du yekdestan dirêjî Şah Ismaîl kir. Li deştika Çildêranê leşkerê Şah Ismaîl şikiya, Sultan Selîm bi hêsanî Tebrîz stend, nigaşa sazandina imparatoriyeke mezin a Şah Ismaîl pûç bû, ket ber avê!

Padîşahên Osmaniyan ku pey Sultan Selîm hatin ji Kurdan ra bêbextî kir, peymana bapîrên xwe şikand, peymannaveyên kalikên xwe çirandin, miriyên serbixwe yên Kurdan yekoyeko ji meydanê rakirin û bi milyonan Kurd bûn dîlên bindest ên Tirkan ! Eva ! Di hengama Şah Ismaîlê Sefewî da "Dasenda Kurd Û. Faris".

DERJÊ

Derjêya van nivîzişên dûrûdirêj eve: Berê zayîna Isa bi 10.000 sal hawişekî Endo- Awrupayî li Araratan cî girt.ibû. Ev hawiş Kurdên îro ye. Kurd, gava hatin Araratan, du birr bûn: Kûtî û. Kurtî.

Kûtiyan ji Araratan ta Antî-Toros, Toros, Sûriya û. Filistîn girtin, peyabûn Zagrosan û. daketin pehnavên Dicle û Ferêt. Li van doran, rastî sê xwehermendên şehrevan hatin : Sûmîr, Akad û. Elam. Bi vana ra

- 284-

şer kirin, di kişwerên wan da fermanferma bûn û bi navên Kûtlyûm û Lolobûm du xwehermend serrast kirin.
Paşê, weşbestên nigaşperwer ên Farisan navên van her du ferweraniyên Kurd kirin "Pêşdadî" û kirin ên Farisan!
Kurdan nlvîzişa Mîxî a Sûmîran pezirand û ji pîşewerî û şehrevanlyên wan behremend bûn. Di demeke hindik da, ji van her sê xwehermendan di şehrevaniyê da pêşvetir çûn.
Kurtî li Araratan demeke dirêj rûnenlşt.in, çima ku darayên keriyên bêjimar ên tarişan bûn : hesp, ga, cêl û pez. Ararat û dorên wan ji milyonan tariş ra têr ne dikir. Loma, Kurtî Ararat berdan, çûn ber bi rohilat. Ji Gola Urmiyê ta Hindistanê - Çemê Send - û çarmedorên Deryayê Kaspîn <Deryayê Kasiyan) ta Deryayê Umanê girtin. Ev kişwerê fireh û gerraze ji bo hezaran sal bû niştimanê Kurtiyan.
Gava ev gertevên han li dora Dicle û Ferêt dibûn, navên Kildan, Asor û Faris li cihanê ne bûn. Ev her sê hawiş paş du hezar sal li van doran xuya bûn.
Kildanî li rexên Ferêt bi cî bûn û li biniya Bexda, li kenarên Ferêt, bajarê Babî1ê ava kir. Asoriyan li rexên Diclê - nêzîkî Mûslla îro - Nînwa ava kir. Ev her du hawiş, ano Kilde û Asor, dest bi saxitandina (teqlîd) şehrevaniya Sûmîr û Akadan kir. Her du jî du xwehermendên leşkerî anîn meydanê. Nemaza Asor peykerek zorba û şeştare stend. Kildanî ji nejadên tevlihev çê bûne, lê Asorî giş Samî bûn. Farisan li hin kenarên bakur û rohilat ên tengava Faris cî girt. Faris jî, mîna Kurdan, ji nejadê Endo- Awrûpayî bûn, hawişek piçûçlk bûn, bi cot û şivanî kariwer bûn, ji ceng û pevçûnê dûr direviyan, serê wan pê ne xweş bû. Farisan asûdegî, aştî û aram dievînandin. Eger hevsiyên wan li wan dirêj bikirana, Farisan dest ne dibir xwe, şer ne
- 285 -
dikir, xwîna xwe ya şerm ne dirijand. Çêtir ew bû: bac bidin neyaran û li quncê asûde rûnin !
îro nivîs warên dîrokê yên cihanê giş çewterêyek girtine : dêlva ku "kişwergîriya Kurd a kevnare" û "şehrevaniya Kurd a kevnare" binivîsînin, cama ji nezaniyê, lê pir caran ji bêdadî, ji nankorî, ji bêbextî, li ser navê

Farisê piçûçik, Farisê pepûk û reben nrvisme. Dêlva ku "Kurd" binivîsînin, bi çewtî "Faris" nivîsîne ! Û paşê, ev nivîsvanên dîrokan pir pêş ve çûne, evçend mezinayiya Kurd kirine Faris û Farlsê pepûk bûye "Fursî qedîm", "eski Faris", "ancienne Perse" ! !

Lê, weka ku we xwend, ev kisseya ku min navê wê daniye "Dasenda Kurd û Faris", min di nav her neh bendên wê da bi awakî pejilandî da fehm kirin : kiş werê girsegir ê ku nivîswarên dîrokan bi çewterêtî û bê maf navê wî kiriye "Fursî Qedîm", ano "Farisê Kevnare", Kurdan bi Kûtî û Kurtiyên xwe û bi tena xwe, bê Faris û Marls, bi pehlewan û qehremanên Kurdan, bi van box û beranan ev şehriyarî, ev Imparatorî, ev şehrevanî anîne meydanê. Kurdan, berî zayîna Isa bi 4.000 sal, bi şikandinên Sûmîr û Akad rahişt vê xebtûkoşa girsegir û pir zorfersa. Û ji van karûwerzlşên dewasa yek bîn asûde ne man : Babîl û Sûz û Lakaş vekirandin, bi xebtûkoşên xwe yên bê aram ji van gelên bindestê xwe pêşvetir çûn: di zanişmendî, pîşewerî, hunermendî, bazirganî, konevanî, leşkerî û di her zaniş û hunerên şehrevaniyê da ketin pêşiya her gelî. Padîşahên Asor endezvanan, hunerweran ji van Kurdan bijartin. Padîşahên Asor di her wesanê da zanişwerî û hunermendiya Kurdan pesinandine.

Di nav van neyarên Kurdan da, ji Asor dijwartir û xurttir tu nebû. Lê Kurdan ji padîşahên Asor ên şeştare û hovnak ra carê tekapu ne kir, ustuyê xwe xwar ne kir. Kurdan nêzîkî du hezar sal, şev û roj, havîn û zivistan bi Asoran ra ceng kir, penc bi penc, gewrî bi gewrî pev çûn, xerpişîn; hêdî

hêdî. bi bihna fireh. ev dijminê xwe Asor, ev dijminê xwe yê hezaran sal ji ruyê erdê rakir û bi awakî demande (ebedî) hunda kir. Ev pîrozbextî, ev kamweriya fêris û flrazwer ku di cihanê da bê heval û yekta ye, bi xebat û werzişên 4000 sal hatin meydanê. Farisan di van salan da yek dilop ji xwîna xwe ne rijand. Farisan di van 4000 salan da tu xebatek, tu karek nîşan ne da.

Kurdan bi ev çend jî qîma xwe ne anî : Gurcistan, Armeniya ku hêj nû ji Trakya hatibû, Pont, Kapadokya û Lîdya vekirandin. Kurd paşê bûn fermanfermayên

Misrê jî. '
Di van hengamên dirêj da, di van 4000 salên kop, xebt û şeran da, tu liv, ger, west û emegên Farisan xuya ne bûn. Faris cotkar bû, şivan bû, carê ne guherî, tum cotkar ma, şivan ma !
Em binêrin paşê, pey van hengaman, di dema Azdiyak bi şûn da çawa bû ? Kurd bi destê xwe Azdiyakê gewende û pespaye derd kir û di şûna wî da Agirdad, ano Kûriş, padîşahê Anzan - ew Anzanê ku ji 2000 sal da niştimanê Kûtî-Amerdlyan bû - anî, li Hemedanê, li ser Textê Keyaniyan rûniştand. Ûdê (Ieqeb) van padîşahên Anzanê Texîxî- Xenî ye. Paşê bi dem û gavan bûye Examenî, paşê Ereb kir Hexamenşî. Kevnerêçên ku di van salan da li Zlhabê (Iran) derketine pir baş nehrevanî dikin û diaşkirînin ku xanedana Texîxî- Xenî, ano Examenî, padîşahên Anzan in, Kûtî-Amerdî ne û Kurd in, ne Faris in, Anzanî ne, ne Pasargadî ne. Tarîxa Merdûx, derpêç 1, rûpel 180, ronak û eşkere dinivîsîne :
"Padîşahên Hexameniyan ku li Hemedan, Babîl û Sûz , li ser Textê Keyaniyan rûniştin sed sal ji xwe ra Padîşahên Mad gotine" . Padîşahên ku di vê sedsalê da padîşahî kir Key Xusrewê Mezin, kurê wî Key Kawûsê kişwergîrê Misrê, Key Darayê Mezin û kurê wî Key Serxes in. Wuha ye. Ev her çar padîşahên Anzanî yên pêşîn bi wegehên xwe Padîşahên Mad bûn, Padîşahên Kurd bûn, ên Faris ne bûn.
- 287 -
Em werin Key Darayê seyim, ano Darayê Madî. Ev padîşahê bedbext dawînê padîşahên Keyaniyan e û bi nav û laşê xwe Kurd e, lê ne Kurdê Anzanî ye, Kurdê Kubbadî ye, neviyê Key Behmenê Madî, Key Behmenê kişwergîr, e.
Nuha ez ji we dipirsim : xanedanek heye ku çar bavên wê yên pêşîn ji xwe ra Mad dibêjin û bavê wê yê dawîn jî dibêje "ez Mad im". Gelo çar hûrikên givrik ên navîn çawa dibin Faris ? Nemaza ku ev her çar ên navîn ne angaştine, ne gotine "em Faris in" ! Ev tişt eşkere ye : ev xanedan ji serî ta binî Kurd e, Anzanî ye, Kûtî-Amerdî ye. Farisbûna wê fendûfût e, şapînozê "şairên" Eceman e ! !
Min bi awakî ronak û zelal Kurdbûna Xanedana Hexameniyan, ano Texî-xî-Xeniyan, aşkaft û danî ber çavan. Îcar dora Aşkaniyan, Arşakiyan û

Sasaniyan e : Kurdbûna van her sê xwehermendan min di nivîzişên xwe yên berê da xweş pejilandî û qenc zûlandî nivîsiye. Di vê kisseyê da tu gûman û vajî ne maye. Ev her sê şehrevanî û ferweranî jî Kurd in : gelên wan 90% Kurd in û bingehdarên her sê şehriyarî jî Kurd in : Aşek, Arşek û Erdişîrê Babekî. Padîşahên han her sê jî neviyên Key Kubbadê Kurd in.
Êdî hûn çi dixwazin ? Gelên wan Kurd, padîşahên wan Kurd, elbet xwehermendên wan jî, şehriyariyên wan jî, şehrevaniyên wan jî Kurd in, ne Faris in.
Ji van "derjê"yên bingehî yên ku nivîzişên min bi awakî vêrast, eşkere, zelal û aşkaftî danîn meydanê hêj aşkarişên din ên givrikî jî hene :
Padîşahên Anzanî, sê padîşahên mezin ên pêşîn :
Key Xusrewê Mezin, Key Kawûs, Key Darayê Mezin, bi kişwergîriya xwe, bi rahijmendiya girsegir a xwe, bi hozanî û zîrekiya xwe, gava bi germweriyeke nêrûfersa ji bo aştî, bextiyarî û bilindiya Kurdistanê dikoşlyan Padîşahên Key Kubbadî jî, ku bajarê Belxê paytextê wan bû, ji bo asûdegî û gumrehiya Kurdistan di xebt û koşa xwe da kêmanî ne dihişt.
- 288 -
Nemaza Key Kiştasep, kurê Key Lehrasep, hêj di sala 660 B.Z. da paytextê Belx berda, hat gevera Faris û bajarê Istexir ji xwe ra kire paytext. Ev gerteva sade ji me ra pir ronak dide xuya kirin ku di van salan da, li van deveran, tu Padîşahê Faris tu nebû û ku li gevera Faris padîşahên Mad fermanferma bûn. Faris weke berê destbendên Kurdan bûn.
Key Kiştasep 69 salên xwe li Istexir buhartin, Istexir fireh kir, xemiland, qoq kir, li paytextê xwe pir guh dida. Klşwerê wî seraser ava, bextiyar û şadiman bû. Padîşahê ha bi sazandina rêdarên dadmendî û şehrevanî navûdeng stendiye. Bi vî awayî xweş xuya dibe ku Key Kiştasep di avakirina welêt û sazandia rêdarên dadmendî û kişwerî da ji Darayê Mezin ra rêberî kiriye û ji Darayê yekim ra bûye mamosta. Key Kiştasep 150 sal berî Key Dara ji welatê xwe ra û ji enzanetiyê ra riya şehrevaniyê vekiriye.
Ji ezbeta Key Lehrasep, Key Behrnenê Madî bi kişwergîriya xwe nav biribû. Evçend jî hozan, zana û gewre bû, mêrek pakbunyad bû û bi dawerî û mihrivaniya xwe nav stendibû. Paytextê Key Behmen bajarê

Şuweş bû. Ew alîdarê dercîkirina Azdiyak bû. Eger Kûrlş, hîn rasttir Agirdad, Anzanî ne bûya, ji ezbeta Kûtî- Amerdî ne bûya û Faris bûya, li ser Textê Hemedanê ne dida rûniştin û Key Behmen bi vî tiştî karibû bindirîne {manî bibe}. Di van deman da, padîşahê xurttir ê Kurdan, hemj ê cihan giş, Key Behmen bû. Padîşahek mîna Key Behmenê Madî yekî Faris - ku ji hezaran salan da destbendê Kurdan e - ne dikir şahînşah 0 li ser Textê Mad ne dida rûnişt.in.

Eva, min bi sedan nivîs warên dîrokên zanişmendan xwendin û bi mûşlkaf'tln min xwendemendî kir, û li dawiyê min ev jêderê deranî : Faris hawişekî piçûçik bû, cotkar bûn, şivan bûn, şer û pevçûnê ne dievînand. Eger zor li wan bihata, bac didadan û dlklşiyan quncika xwe û bi asûdegî û aştî rûdiniştin!

- 289-

Nemaza, dema ku Key Kubbadê Kurd padîşahiya Mad serrast kir û Hemedan kire paytext, dirêjî Asoran kir û ev padîşahên zorba û bê wicdan şikandin, Faris bicarek ba benddestê Kurd, û ji wê demê da, ano ji 763 B.Z. bi şûnda ta hatina Iskender, 430 sal Faris bi tumî man di bin destê Kurdan da.

Paşê, ano pey qewurandina Selefkiyan ta kuştina Yezdê Kurd û hundabûna şahînşahiya Sasaniyan, ev bûniş demand. Ano, Faris berbendê Kurdan man : ziman zimanê Kurd ba, ferwermendî û ferweranî yên Kurd ban, şehrevanî jî şehrevaniya Kurd ba. Wê gavê hêj "Fursî Qedîm" tu neba ! Paşê Ereb ji ber xwe çêkir ! ! Di vê hengamê da, ev imparatoriya fêris û pehnawer a Sasaniyan Kurd ba ! Ev kişwerê bê payan Kurdî dipeyivî, zimanî gişkî Kurdî ba. Keça Yezdê Kurd Şehrîban Xatûn ji bavê xwe Yezdê Kurd Padîşah ra bi kurdî reşbelek dinivîsandin! Xwejber, çawa zimanî gişkî kurdî ba, wuha jî hertiştê vî kişwerî kurdî ba : welat, padîşah, gel, şehrevanî ... giş Kurd ba.

Ta vê demê, Faris, zimanê Faris, şehrevaniya Faris li meydanê tu neba.

Omer Ibn Xettab û Xelîfeyên Emewiyan gelê Kurd, şehrevaniya kurd, zimanê kurd, hebana kurd, her tiştê kurd hunda kirin! !

Paşê, cardin qehremanek û pehlewanekî Kurd derket meydanê ! Ev Kurd Eba Muslimê Xoresanî ba ! Vî Kurdî bi germdilî, bi camêrî û bi

kurdperweriya xwe Emewî hunda kirin. Eba Mus llmê Xoresanî Ebbasî li şana wan rûnlştandln û Faris bi camêrî û mêraniya Kurdekî ji Erebbûnê reha ban. Ji vê gertevê du sed sal bi şûnda, zimanê Farisî eşkere ba, derket meydanê (48) û aheng û xweşbestên Farisî dest pê kir !

Li hengama dawîn a Ebbasiyan - hemj hîn rasttir, pey Ebbasiyan çend sedsal bi şan da - di dema Sefewiyan û peyhatiyên wan da, nemaza gava ku ji

- 290-

bêbextiya padîşahên Osmaniyan Kurd ban gorî, destê wan hat girêdan û devê wan hat girtin û meydan bicarek ji Farisan ra ma, Farisan wesanekê bi qîma xwe xist destê xwe, lîzbazî û sivikdestî kir, bi dek û zexelî û saxtekarî her tiştên Kurdan: firazbazî, navdarî, şanûblltndî, kişwergîrî, şehrevanî ... ya Kurdan gişk kirin dasa xwe û li ser navê Faris nivîsandin.

Di destpêkê da ev dek û zexelî ku min navê wê kiriye "sivikdestî" bi awakî bîrnebirî (bê hiss) ba. Weşbest û çîrokbêjên Farisan ên pazên (derece) duyim û sêyim di van deman da hin çîrok û efsaneyên qehremanî ber bi hev dianîn, li çayxanan, li şato û malan, li der û beran dixwendin û pê nanê xwe pêk dianî. Lê, li vira şayanê bernihêrî tiştek heye: weşbest û çîrokbêjên Eceman - ji tune bana qehremanên Eceman - bênev mane, qehremanên Kurdan pesinandine : Zal û kurê wî Rustem.

Di van salan da - sedsalên 13im û 14im P.Z. - ferweraniyeke na serrast baba. Navê vê ferweraniyê "Xeznewiyan" ba. Sultan Mehmûdê Xeznewî yê Tirk ji van çîrok û weşbestên qehremanên efsaneyî pir dilgewz diba. Sultan Mehmûd civandin û nivîsandina van destan û çîrokên efsaneyî ji weşbestê navwer Firdewsî xwest û jê ra gotin û newîd da ku ji bo her xaniyê weşbestekê ewê dê zêrek bide.

Firdewsî ev çîrok û çîrçîrok pir baş ji ber klribûn û di aheng (wezn) û bareyê (qafiye) da bê heval ba. Firdewsî bê aram û west sî sal ev efsane bi awakî zîba û zîwer, bi xweşahengî û bare, nivîsandin. Dawiya dawîn, ji heftê hezar cotik destaneke qehremanan anî meydanê ! Ev destaneke qehremanên nigaşan ba ! Efsaneke efsanan bû ! !

Ecemên wan deman û Îraniyên îroj ku van çîrok û destanên. vir û derewan pir dievînin gelo wek gertevên dîrokî yên vêrast godariya wan dikin û pê bawer dibin?
- 291 -
Paşê, pêy sedsalan, ji Awrûpa û Hindistanê çapxane hatin Ecemistanê jî. Û gava Eceman nivîs war çap kirin, ev nivîs warên efsanan jî çap bûn. Berê sedsalekê, gava Ecemistan xwendegeh sazandin, ji wan ra nivîs warên dîrokan jî divabû. Dîroknivîsên Ecem ji bo nivîsandina dîrokeke "hawişî" ev çîrokên efsaneyî ji xwe ra kirin serekaniyeke dîrokî ya hêja. Nemaza benda Pêşdadiyan pirs bi pirs ji efsaneyên Firedewsî jêgirt (kopya kir). Keyanî, Aşkanî, Sasanî û Sefewî jî bi hêsanî bi ser Pêşdadiyan efzûnandin (Ilawe kirin>. Dapara (Ist.lhqaq) Kurd tarac kiribû, destê wî girêdayî, devê wî girtî bû, meydan ji Faris ra mabû, kesê ku ji Faris ra bipaşîne (îttraz bike) ne mabû!
Bi vî awayî, Faris bi "sivikdestî" 0 bi hêsanî li ser dapar, dast 0 mafê Kurd venişt ! !
ÇEND PIRS DI GIHAJA FIRDEWsî DA
Li gel agahiya min bi ziman 0 wîjeya (edebiyat) farisî, min ne karîbû heftê hezar cotikên Firdewsî gişî bixwînim. Li gel vê yekê, min ji destana farisî ya Firdewsî çend sel malikên bijare, çîlwerk (bi mubalexe) û dilhej xwendine. Firdewsî bi vê yadbera xwe pir baş aşkartiye ku ew di aheng, bare, çî1werî, nigaş û efsanefiroşiyê da hunerwerek yekta ye.
Ev yadbera dêwasa ji aliyê danişweriya dîrokî ne hêjayê tiştek e. Yek ji malikên wê nikare ji dîrokê ra bibe sparte .
.
Bi bawermendiya min, Firdewsî gava ku "Şahname"ya xwe nivîsî, bi kevirek sê çûkan dixwest bikuje :
1- Bawermendiya wî di gihaja Ereban da çi ye deyne meydanê :
"Ji şîrîşûtur xurden û sûsimar Ereba becayî resîdeste kar
- 292-
Kî tacî Keyan ra kuned arezû Tufû bertu ey çerxîgerdan tufû".
2- Evîna xwe ji ola Zerdeşt ra pêş xwar dike "Kî ma ra ez dînî kuneh neng nist.

Be gîtî bih ez dînî Hoşeng nist.
Heme rahî dad est ayînî mi hir
Nezer kerden ender şumarî stpêhir",
3- Herdemî û xurtiya zimanê Faris :
"Besî renc burdem der în salî sî
Ecem ra zinde kerden be in farisî, rn."
Firdewsî çûkekî din jî dê lêxista : ji Sultan Mehmûdê Xeznewî hezaran zêr dê biflranda ! Gewremerdên (wezîr) bedbunyad ne hişt. Firdewsiyê naçîz yek pere ne kir bêrîka xwe !
ARMANCA MIN DI NIVYSBEJA (MEQALE) "DASENDA KURD Û FARIS" DA
Ev kisseya ku min navê wê daniye "Dasenda Kurd û Faris", ji nivîsandina wê armanca min eve:
Ez dixwazim ku serhatiyên Kurdan ku 6.000 sal berî zayîna îsa dest pê kirine û ku hê jî didemînin bi kurtebirî bidim fehmandin. Kurd bi buhayê xwîna xwe, bi canfeşanî, pêdarî, mêranî, zîrekî û bi jêhatiniya xwe nîştiman, dîrok, kişwergîrî, navawerî (şuhret), firazdariyên ku anîbûn meydanê, bi leyandinên Ereban ji nişkava û bicarekê hunda kirin û Faris bi saxtekarî ev tiştên Kurdan kire dapar, dast û mafê xwe.
Ezê vê yekê qêr bikim li cihanî gişî ! Nemaza ji

zanayên dîrokê ra wê bidim zanîn û vê çewtûxwariya pir mezin a dîrokê bidim rast kirin û bi enzanên cihanê gişî bidim bihîstin !
Min bi nîşaneyên dîrokî, bi jimardekan (reqem), bi dares (rnuhakeme) û bi hoşrnê] (mantiq) aş kart ku Faris dapar, maf û dastên Kurd tarac kirine. Ez vegera dad û maf dixwazim û wehrija (qerar> xwe ya dawîn didim : "Fursî Qedîm" tune ! "Eski Faris" tune ! "Ancienne Perse" tune !
"Qedîm" Kurd e ! "Eski" Kurd e ! "Ancienne" Kurd e !
10- DASENDA KURD Û FARIS A ÎROJ
Di 1925 P.Z. da, Riza Xanê Pehlewî, dawiya Xanedana Kacaran anî û xanedaneke nû, Xanedana Pehlewî, saziman kir. Kurd hemû ketibûn umîdeke mezin. X wendemendên Kurdan pirsa "Pehlewî" çi ye baş zanîbû. Pehlewî - hîn çêtir "Pehleyî" - şêrîntlrê zaravên Kurdî ye (49)

Riza Xanê buhuştî gava navê xanedana xwe ya nû kire "Pehlewî", ji Kurdan ra umîdeke mezin dabû. Kurdan zanibû ku Riza Xan ji êla Mezindiran e û ku ev êl jî ji kevntirên êlên Kurdan e, Van Kurdên xwendemend cardin zanibûn ku bapîrên wan - Kûtî û Kurtî - ji hezaran salan va di giloreya Îranê da çi roline bergiran lîztine, û bawermendiya van Kurdan hebû ku eger îro jî Kurd şep û wesan têke destê xwe, ew dê rolên bapîrên xwe yên hezar salan cardin karibin bilîzin û ji giloreya Îranî ra pir bi kêr bên. Ji bo ku Riza Xanê ronakrewan ku ji êla Mezindiran bû û ji xanedana xwe ya nû ra jî navê Pehlewî stendibû, Kurdan gûman biribû ku roja wan a azadiyê hatiye ! Ew azadiya ku Kurd hezar û çar sed sal e li benda wê ne !

Zehî nigaşt ! Umîdên Kurdên bedbext, gûmanên wan, baweriyên wan zû bi ber bê çûn ! !

- 294 -

Gava Riza Xanê Pehlewî lixava şahane li dest girt, li roavayê Îranê tûdevaniya Mustafa Kemal Paşa na serrast baba. Ev tûdevaniya na ya Mustafa Kemal Paşa û Ismet Paşa ji benîdaran (sahlbî ebîd) û kolonyalîstan ra nifir dixwendin, newîd (soz) dikirin, sond dixwarin û peyman didan ku kolonîtî, benîtî û zorbatî ji kişwerê kevnare yê Osmaniyan ew dê rakin. Van paşan, di 1919 da, li Erzeromê, li Sêwazê, di "qonxir"an da bang kir û got: xwehermenda na ku ew dê bingeha wê deynin xwehermenda Tirkan û Kurdan e ! !

Mustafa Kemal Paşa û Ismet Paşa bi alîkariya Kurdê camêr û mêrxas Yewnan avêtin derya û tavil van Paşan newîdên xwe jî, bedlhên xwe jî ji bîr kirin ! Ji Kurdan ra xweş maf dan ! Mêrxas radestên mirarkeran (qatil) kirin, jin û zarûk jî xistin kadînan, agir berda wan û şewitandin ! Milyonek Kurd - pirê wan pîr û kal, jin û zarûk - bi işkence, agir, êş û nalînan hunda kirin! !

Mustafa Kemal Paşa newîdên ku dabûn Kurdan çawa bi zûka ji bîr kirin, Riza Xan jî navê bilind ê Pehlewî ji bo engîzeke çiçend plrflraz û giramîdar stendibû, pir za ji bîr kir !

Riza Xan ku di gellek tevgerên xwe da Mustafa Kemal diminand, ji mirarkerlyên wî û Ismet Paşa ra jî dilbijokî kir ! Riza Xan ji birayên xwe

yên xura ra, ji Kurdên ku ji sedsalan ve ji bêdadkerî, renc, êş û rûmet.şkeniyê pêva tiştekî din para wan ne baba, mîna Mustafa Kemal û Ismet, her babet stemkerî û malmîratî kirin !
Riza Xan birayên xwe yên xura şandin sêpêyan, dan ber tîran, bi hezaran bêguneh - pîr û kal û zarû - qewirandin, bê mal û bê gund hiştin, dûrandln (nefî kirin) ! !
Paş hatiyê pîroz bext , puserê Riza Xanê Pehlewî hêj na li Textê giranbext ê Îranê rûnişt.ibû, gertevê xwînî ê Mehabadê Kurdên stemdîde bi bûnişên reş
- 295 -
Nexşeya Kurdlst.anê : Ev nexşe li nav "Mêrnorandumeke li ser rewşa Kurdan 0 daxwaziyên wan" ji Rêxistina Neteweyên Y ekbûyî (D.N.liJ re, li Parîsê, di 1948 de hat pêşkeş kirin.
Wêneya nexşê bixwe di Nîsan 1946 de hat çêkirin.

1. pir bi êş nalandin. Ez naxwazim van birînên dijwar, van kulên kar na bikim. Ez niyaz mend im ku Kurd, ano birayê mezin ê gloreyê Iran, ta ku cihan payidar e, careke din jî dilxwîniyeke wuha nebîne!

Gava ez van rêzên han dinivîsînim, li pêş min herşeke Kurdistan 0. Farlslstan raxistî ye 0. ez bi ettayî (diqqet) lê çav digerînim. Ji aliyê din jî, nivîs wara Merdûx li pêş min e 0. ez ji rûpel 48 van rêzan dixwînim : "Ma mî tuwanîm bigoim ki luxetî kurdî der temamî wîlayetî Iranî kî Iskenderî Makdonî ber an hukumfermayî kerde umûmiyet, daşte". W ergişa wê bi kurdî : "Em karin bibêjin ku zimanê kurdî di gişî wilayetên Iranê kevnare da, ku Iskenderê Makdonî fermanfermayî dikir, zimanê gişî bo.". Q di tenişta min da du ferhengên farisî hene: fransizî-farisî, farisî-fransizî. Lê, muxabin, pirsên ku ez ji van du ferhengan dixwazim ji dehî yek dikeve destê min ! Zimanê farisî yê îroj 90% Erebî ye ! ! Kurd 1300 sal e ku di bin givaja Ereb, Ecem 0. Tirk da ye. Spas ji Yezdan ra ! Zimanê Kurdan ne ketiye roşmana zimanê farisî 0. tirkî.
Min ev nivîs wara dîrokê bi zaravê kurmancî nivîsand, paşê min ew li tirkî wergişt. Di nêzîk da ez dê wê jî çap bikim. Ez pir niyaz mend im ku bext bi min yawer bibe, farisî 0. fransiziya wê jî çap bikim. Ev nivîswara min a

dîrokê 300 rûpelî ye. Tê da yek pirsa biyanî tu neye. Lê, eger nivîswareke farisî 0. bi 300 rûpel bê çap kirin, divê em 10.000 pirsên erebî bişorînin. Ez naxwazim vê klsseyê , "Dasenda Kurd 0. Faris", bêtir dirêj bikim. Loma, dawiya nlvîzlşa xwe tînim 0. di mandê (rojên li ber me) da dasenda Kurd 0. Faris dê çi bibe dipirsim. Ez pir hêvîdar im 0. niyazkar im ku ji bo her duyan - Kurd 0. Faris - ev "mand" bi kêr 0. bi sad bibe. Ez pir hêvîdar im ku ew rojên tal 0. reş bên ji bîr kirin.

- 297 -

KURTEYEKE KRONOLOJîK

IMPARATORî, DEWLET Q MîRIYt:N KURDî

1- BERt: ZAYîNA ÎSA

10.000 B.Z.

Koçbariya Gişti ji Iskandînavya ber bi Çiyayên Qefqasyê, Wê gavê bapîrên Kurdan du beş bûn :

A- KOTI (Kurdên Rojava). Li dora Araratan bi cî bûn. B- KURTI (Kurdên Rojhilat). Çûn Deryayê Kaspînê, sînorên Hindistanê û Deryayê Umanê.

4.000 B.Z. A- KOTI

10 dewlet ava kirin : Kûtiyûm, Hûrî, Lolobûm, Anzan, Kardûnya, Mîtan, Nehrî, Xal tî, Mûşkî, Alarod (Ûrartû) :

1- KOTIYOM (welate KdtJyan) : 4.000 - 3.100 B.Z. Dewletek gelek fireh û pêşketî bû. Ji Çiyayên Araratê heta başûrê Çiyayên Zagrosê dirêj bû. Li Şehrezor (Suleymaniya) û dora wê û piştre li Toros, Anti-Toros û heta sînorên Misrê hukm kir. Bi Sûmir, Akad û Elam re şerr kir.

Paytext : Lakaş, ku padîşah Anrl-Daprtz di 3.700 de ji padîşahê Akad û Sûmir, Naramsîn, stend.

- 299-

Şah@n navdar : Anri- Daprlz, Anatom 1, Anatom Il, Kdtlya, Lokal-Zakis, TIrikan, Sarlaq.

Vê dewleta Kûtiyûm 900 sal ajot, piştre hunda bû. Lê gelê kûtî di 620 B.Z. de xwe gihand Imparatoriya Mad.

2- HORI : 4.000 - 1.200 B .Z.

Ji zozanên bakurê Mêzopotamya heta Diyarbekir, Xarput Q Dersimê dirêj bû. Ji sala 2.000 heta 1.200 B.Z. Hûrî tevî Mîtaniyan bûn. Sûriye Q Filistîn

stendin. Ji 1.483 heta 1.463 B.Z. bi Misr, Firawn Thutmes, re şerr kir. Piştî 1.200 B.Z., Hûrî Q Mîtanî ji aliyê Hitîtan hatin hunda kirin. Piraniya wan xwe gihand Nehriyan.
3- LOLOBOM (welatê Loloyan) : 3.700 B.Z.
Di navbera Kirmanşah Q Bexdadê de dirêj bû. Bi Akad re, bi alîkariya Kûtiyan, Q bi Asor re şerr kir. Di şehrevanî Q hunermendiyê de gelek pêş de çû bû, Di 620 B.Z. de xwe gihand Imparatoriya Mad.
Paytext : Zimri, di 900 B.Z. de. Piştre Asor ew stend.
Şah@n navdar : Laslrab, Satdn, Amobanina.
4- ANZAN : 2.800 B.Z. - 800 B.Z.
Ji başûrê Zagros heta bakurê Elam. 2.000 sal ajot. Şahên navdar : Texixi-Xent-Kdti-Amerdt, KdrJş@ Mezin. (Gotina Hexamenşî ya farisî Q Achamênldes ya fransî ji Texîxî-Xenî hatiye. Kûrtş şahê Anzan e, ne - weka ku Faris dibêjin - şahê Pasargad e).
- 300-
5- KARDONY A (welatê Kaslyan) : 1977 - 1.277 B.Z. Kasî ji Zagrosan hatin bakurê Babilistanê û kenarê Çemê Diclê vegirt. Bi Babil re şerr kir. Di 1765 B.Z. de, bi alîkariya Kûtî û Loloyan, Babil stend. Di 1760 de, dewleta Akamil, nêzîkî Sûmir stend. Kardûnya yek ji 4 imparatoriyên mezin ên wê demê bû : Kardûnya, Mîtan, Hittît, Misr. 700 sal ajot. Di 612 B.Z. de xwe gihand Imparatoriya Mad.
Şah@n navdar : Aldlm-Kakrim, Kandlj.
6- MIT AN : 1.600 - 1.200 B.Z.
Imparatoriyeke mezin zû çêkir : Kurdistana rojava, Sûriya, Amar, Arafa û Asor stendin. Di 1483 B.Z. de. bi alîkariya Hûriyan, bi Misr re şerr kir. Vê Imparatoriyê 400 sal ajot, piştre ji aliyê Misr hat hunda kirin. Di 1.200 B.Z. de, bûn Mîtanî bûn tevî Hûrî û Nehriyan.
Paytext: Vaşo-Kanî.
Şah@n navdar (NefertîW.
Sosatar, Artatama, Tadu-Hepa.
7- NEHRI : 1.500 - 612 B.Z.
Li Çiyayên Araratê xuya bûn. Dewleta wan ji Kaniyên Dicle û Firatê heta Çiyayên Nîfast - Bitlis. Diyarbekir, Xarpût, Dersîm -, Çiyayên Toros û

Geliyê Zabê dirêj bû. Di dema Iskederê Mezin de, ji vî welatî re "Kurduwan" dihat gotin. Di 1.128 B.Z. de dest bi şerrê padîşahê Asor, Tiklat Palazar, kir. Şerrê Nehriyan bi Asor re 2.000 sal ajot. Di 612 B.Z. de, bûn tevî Imparatoriya Mad.
Paytext : Tospa. (Van).
- 301 -
8- XAL TI : 1.500 B.Z.
Li Araratan, li Kurdistana navîn, dewleteke xurt danî. Piştre daketin Antî-Toros û kenarên Deryayê Reş. Hêrodot ji wan re Alarod digot.
Paytext : Tospa (Van).
9- MOşKI : 1.100 B.Z.
Welatê Mûşkiyan ji bakurê rojava yê Kurdistanê heta Kapadokya û Kîlîkya dirêj bû. Di Tewratê de navê wan "Maş" e. Di 770 B.Z. de, tevî Kurdên Araratê, dijî padîşahê Asoran, Sargon 1, şer kir. Di 612 de bûn tevî Madan.
10- ALAROD (ORARTO, ORARTQ = ARARAT)
829 B.Z.
Orartû ji yekbûna hemî Kurdên Sûbarî : Hûrî + Mîtanî + Nehrî + Mûşkî + Xaltî bûne. Wan hergav bi Asor re şerr dikir. Di 612 de gihîştin Imparatoriya Mad.
Paytext : Tospa (Van).
Şah@n navdar: M1nwaş, Sardorts 1, Arkîtses, Sardarts Ul, Mina- M.
B- KURTI
1- MANNAI
Ew ji yekbûna Partas (Part), Gimrî û Sît bûn û dewleteke piçûk li başûrê Gola Urmiyê (Kurdistana Iranê) danî.
Paytext: bajar@ Urmiy@ (iro : Rizaye).
Şah@n navdar : Artîsari, Iranzo, Aza, 01osono, Dlyago.
- 302-
2- MADe PIçOK
Beşek ji Madan dewleteke bi navê "Madê Piçûk" li Azerbaycana îro, ku ji berê navê wê Atorpatka bû, ava kir. Di 853 de, di dema Key Kubbadê Kurd de, xwe gihand Madê Mezin.
3- MADe MEZIN (IMPARATORIYA MAD A MEZIN>

4.000 B.Z.
Madan wê gavê nîvê Kurdistanê vegirti bû : ji sînorên Hindistanê heta rojhilata Çiyayên Zagrosê û ji Gola Urmiyê heta kenarên Xelîcê Umanê. Wê gavê, Faris bitenê li ser erdekî piçûk, li kenarê Xelîcê Farisî, diman.
2.800 B.Z.
Xuyabûna padîşahiya yekemîn a Madan. Padîşahê wan bi Akadan re "lihevkirina aşîtiyê" imza kir.
2.100 B.Z.Şer bi padîşahê Asor û Kildan, Nîne, re kir.
Paytext : Belx ul Afganlstana iro>. Padisah@n Medan @n navdar .:.
853 B.Z. _ Key Kubbadi Kurd Ji aliyê piraniya Kurdên Kaspînê hat bijartin. Qanûnên bingehî danîn û leşkerekî gelek xurt û rêkûpêk dijî Asor pêk anî. Dijî Sardanapal, padîşahê Asor, şerr kir û ew şikand. Bi waliyê Babil, Bîlezis, re lihevkirinekê imza kir û Farisistan xist bin destê xwe.
Di 759 B.Z. de mir. 120 jiya û 94 sal hukm kir. Paytext : Hemedan (Ekbeta.n) (Kurdistana Iranê),
759 B.Z . .:. Key Kawus
Kurê Key Kubbadî Kurd. Gelek ciyên Hindistanê
- 303 -
vegirtin. Bi Hamawran "Yemen" re şerr kir. Piştre pê re aşîtî kir û bi keça padîşahê wê, Zu El-Azar, re zewicî.
Di 715 B.Z. de, bê zarok, mir. 44 sal hukm kir. Piştî mirina wî, du padîşah hatin bijartin : Key Lehraseb ku paytextê wî Belx bû û Key Tos ku paytextê wî Hemedan (Ekbetan) bû.
Al Padîsahên Med @n Belx : 715 B.Z.1 Key Lehraseb
Tiştekî zêde ne kir. Bitenê Zerdeşt III parast û Ola Zerdeştiyê fireh kir. Di 667 B.Z. de xwe kişand û tacê xwe da kurê xwe Key Kiştaseb.
667 B.Z.1 Key Klstaseb
Kurê Key Lehraseb. Piştî çend salan Belx berda û bajarê Istexir, li Farisistanê, kir paytextê xwe. Ew gelek dadmend û zana bû. Bi avahiyên mezin û qanûnên cezaî û mulkî navdar bû. Di 601 B.Z. de li Şîrazê mir. 66 sal hukm kir.
601 B.Z.1 Key Behmen

Gelek navdar bû û gelek navên wî hebûn : Erdişîrê Dirêjdest , Axşewîros, Behmenê Madî. Cihangîrekî mezin bû : heta Hindistan û Hebeşistanê vegirt. Bi tenzîmên idarî jî navdar bû. Alîkariya Yahûdiyên Babilê kir. Paytextê wî Şewêş (nêzîkî Bexdadê) bû. Di 532 B.Z. de mir. 68 sal hukm kir.

533 B.Z.1 Keyband Humay

Keça Key Behmen û şahbanuya pêşîn a Kurdan e. Paytextê wê Tîsfon, nêzîkî Medayin, bû. Di 494 B.Z. de mir. 40 sal hukm kir.

- 304-

.lU. Padîsahên Med ên Hemedan 715 B.Z . .:. Key Tos

Padîşahekî gelek mezin bû. Dewleta wî ji dora Belxê heta Deryayê Reş û ji bakurê Deryayê Kaspînê heta kenarên Deryayê Umanê dirêj bû. Ji aliyê nizamê dewletê gelek navdar bû : qanûnên medenî û cezaî derxistin û xistin nav yek pirtûk bi navê "Pazend". Li bajaran dadgeh (mehkeme) û li gundan dadgehên seyyar danîn. Qanûnên eskerî jî derxistin: mecliseke bilind ji 7 endaman danî. Yeke din a firehtir jî ji bo şîretê danî. Protokol û awayê tevgerê li ber Şah pêk anîn. Hemedan gelek xemiland : 7 dîwarên rengîn ên bajêr da ava kirin. Dîwarê 6mîn zîv kirî û yê 7mîn zêrkirî bûn. Çandin, bazirganî, sinaet ... gelek pêş de birin.

Ji aliyê siyaseta derve jî gelek jîr bû : bi kesî re şerr ne kir û tukes jî ne diwêriya ku şerrê wî bike. Di 655 B.Z. de mir. 60 sal hukm kir.

655 B.Z . .:. Key Fedbrez

Kurê Key Tos e. Sînorên welatê wî li Rojhilatê Çemê Ceyhûn (Amoya) û li Rojavayê bakurê Mêzopotamya û Toros bûn. Lîdya, Kîlîkya û Fînîqya bac dida wî. Yahûdiyan û Misr lihevkirinekê çêkir û ketin bin parastina wî.

Navenda ayina Zerdeşt ku heta nuha li Belxê bû anî Hemedanê. Bi Asor re şerrekî mezin kir. Di şerr de, di 625 B.Z. de, mir. 30 sal hukm kir.

625 B.Z . .:. Key Abu (hundak.erê Asor)

Kurê Ferîbrez. Amanca wî ya yekemîn şkenandina Asor û stendina heyfa bavê xwe bû. Leşkerekî gelek xurt amade kir. Ji bo vê yekê, bi Babil re aşîtiyê imza kir û keça xwe da Boxotonasar, kurê padîşahê Babllê "Nabobalasar". Tevî leşkerê Babilê

- 305 -

çû ser Nînwa, paytextê Asor. Lê neçar bû ku dorgirtina wê berde ji bo ku Sîtan - ku ew jî gelekî kurd bûn û pirr şerker, talanker û dijwar bûn - biqewirîne. Piştî şkandina wan, Key Aksar vegeriya Asor.
Di 612 B.Z. de Nînwa stend. Asor bicarek hil weşiya. Piştî vê hilweşanê, hemî Kurd: Kûtî û Kurtî (Kurdên Rojava û Rojhilat) xwe gihand Medan û Imparatoriyeke gelek mezin û xurt danîn.
Sînorên Madistanê gelek firehtir bûn : Hundirê Hindistanê, Çiyayên Qefqas, Gurcistan, Ermenistan, Pont û hemî Anadolû, giravên Ege, Qibris, Misr, Lîdya, Sûriye û Filistîn. Gelek caran, leşkerê Med çû Habeşistan û Yemenê.
Di 584 B.Z. de mir. 41 sal hukm kir.
584 B.Z . .:. Key Azdlyak (Ixtovlko)
Kurê Key Aksar. Mezinayiya padîşahên din li ba wî tu nebû. Wezîrên wî neçar bûn ku wî rakin û dêlva wî Key Xusrew (Kûrlş), padîşahê Anzan, deynin.
560 B.Z . .:. Key Xusrew@ Mezin (KOris)
Neviyê Key Azdiyak. Padîşahekî gelek mezin û navdar bû. Li Rojavayê, şerrê padîşahê Lîdya, Krêzos, kir û Lîdya ragihand Imparatoriya Mad. Piştre çû Babilê Û izn da Yahûdiyên ku bi salan di bin dîlîtiyê (esaret) de bûn ku vegerin Filistînê. Sînorên xwe fireh kirin heta Çemê Send li Hindistanê û heta Qefqasan Ermenistan, Pont, Kapadokya, Deryayê Reş û Gurcistan.
Di 531 B.Z. de, piştî birîndarbûna xwe di şerrê Massajêtan de, mir. 29 sal hukm kir.
- 306-
531 B.Z.1 Key Kawus
Kurê Key Xusrewê Mezin. Di 524 B.Z. de bi Misr re şerr kir û ew şkand. Piştre ket Lîdyayê. Gava ku vegeriya Sûriyê, ji vebûna hin birînan, di 521 de, mir. 10 sal hukm kir.
521 B.Z.1 Dara !
Ji bo ku Key Kawus kur ne hişt, Key Dara bi hilbijartin hat ser text. Ew ji mîrên Anzan û KûtîAmerdî bû. Kurd bû, ne Faris bû.

Ji Key Kawus Imparatoriyek û leşkerekî yekta stendibûn : sînorên wê li Rojhilatê Hindistan û geliyên Send bûn. Li Bakur Çemê Ceyhûn, Deryayê Kaspîn, Çiyayên Qefqas, Deryayê Reş, Marmara, Deryayê Ege. Li Rojava : Deryayê Sipî. Li Başûr :
Deryayê ilman, Misr, sînorên başûr ên Lîbya û Hebeşistanê.
Lê, mixabin, Dara li serayê xwe wezîr û generalên Faris tayîn kirin. Keça xwe da Mardonyosê Yûnanî û ew kir serokê leşkerê xwe. Generalên wî jî Ermenî û ji gelên din bûn. Leşkerê xwe bi serbazên (esker> biyanî yên cihê tije kir. Herkes dijî vê siyasetê derket. Li her der serhildan çêbûn. Dara ew şkandin. Lê, di warê idarî de gelek baş bû, nemaze di pêkanîna nizama Postê de.
Li Rojhilatê, çfi serrê Hindistanê, ji bo ku sînorên xwe di ewlehiyê (emniyet) de bihêle. Li Rojavayê, çû şerrê Yûnanistanê : li ser riya xwe şerrê Sîtan kir, lê bi wan - li Trakya - nikarî bû, vegeriya. Piştî salekê, vegeriya Yûnanistanê û şerrê Maraton ê navdar di 490 de kir, lê şkest. Di 487 de mir. 34 sal hukm kir.
487 B.Z . .:. ~ Serxes
Kurê Dara I. Misr ku ser hilda bû şkand. Piştre çû şerrê Yûnanlstanê, ji bo ku heyfa bavê xwe bistîne.
- 307 -
Li geliyê Termopîl, li Isparta, general Lêonîdas ew şkand. Piştre şerrê limanê Salamîn kir û cardin, di 479 de, hat şkestin. Di 465 de mir : generalê wî yê Yûnanî, Artabanos, ew jahr kir. 22 sal hukm kir.
465 B.Z . .:. Key Erdisir!
Kurê Key Serxes. Gava ku bû padîşah, hîn zarok bû. Qet şerr ne kir. Di 424 B.Z. de mir. 41 sal hukm kir.
424 B.Z . .:. Key Dara Il
Her du birayên xwe kuştin û li ser text rûnişt. Serhildanên hundirî pirr bûn. Di 404 B.Z. de mir. 20 sal hukm kir.
404 B.Z . .:. Key Erdlsir Il
Kurê Key Dara Il. Birayê wî, Key Xusrew, dijî wî şerr kir û hat kuştin. Bi generalê leşkerê Isparta, Ksênofon, re şerr kir "Vegera 10.000an". Di 358 B.Z. de mir. 46 sal hukm kir.

358 B.Z. .:. Erdlstr III
Gelek stemkar (zalim) bû. Şerrê Fînîq û Misr ku ser hilda bûn kir. Di 338 B.Z. de mir. Generalê wî yê misrî, Bogoas, ew kuşt. 20 sal hukm kir.
338 B.Z . .:. Key Dara III (Daray@ Macit)
Ji nifşê (nesl) Anzan û neviyê Şahbanû Humay bû. Iskenderê Mezin ê Yûnanî êrîş kir. 3 şerr çêbûn : di 334 de, li Kenarê çemê Nîfos, nêzîkî Deryayê Ege. Di 333 de, li Kîlîkya (Adana), nêzîkî Ipos = Tersos. Di 331 de, li Erbîlê. Di her sê şerran de jî Dara hat şkestin. Iskender hemî Madistan stend :
- 308 -
JI sinorên Hindistanê heta Deryayê Reş. Ji Qefqasan heta Hebeşistanê.
Iskender li Babilê di 323 de nexweş ket û mir. Piştî wî, generalê wî Sêlêkos ciyê wî stend û padîşahiya Selefke danî.
U KURDISTANA NAvtN, DEWLETA MAD: 255 B.Z. Di bin Imparatoriya Selefke de, piştî serhildaekê, çêbû. Gelek zanîn li ser destpêka wê nîne. 200 sal şûnde, di 35 B.Z. de, Padîşahê Aşkaniyan Venûn bû. Xelk ew rakir û dêlva wî padîşahê Mad, Erdişîr III, danî. Piştre, padîşahê Mad, Erdiwan III, paytextê Aşkaniyan, Medayin, stend û her du dewletên Mad û Aşkaniyan yek kir. Vê dewleta yekbûyî sedsalek ajot.
U KURDISTANA NAvtN, DEWLETA AŞKANIYAN 225 B.Z.
(Ewropî j@ re "Parthe" Q. Ecem, Ereb Q. Tirk "Fursî qedîm" d1b@jln)
Dijî Selefke ser hilda û dewleteke serbixwe çêkir. Arşek = Aşek ew danî. Ew ji neviyên Dara III bû, ji Belx hati bû. Vê dewletê gelek mezin bû : ji Hindistanê heta Deryayê Reş. 451 sal ajot. 37 padîşahên wê hebûn. Yên navdartirîn : Arşek, MJh1rdad 1, Ferhad U, HOrd 1.
157 B.Z.1 Mihlrdad !
Padîşahê 6mîn bû. Baxterî, Babil, Hemedan, Mêzopotamya stend. Li Rojava, di 148 B.Z. de, padîşahê Se lefke , Dîmîtriyos, êrîş kir. Dîmîtriyos hat şkestin û dîl hat anîn Medayin. Piştre, Mihirdad çû, ket Hindistanê. Di 138 de mir. 9 sal hukm kir.
139 B.Z.1 Ferhad Il
Kurê Mihirdad. Antokyosê 7mîn, padîşahê Selefke,
- 309 -

êrîş kir û hat şkestin. Di 127 B.Z. de ji aliyê leşkerê xwe hat kuştin. 12 sal hukm kir.
55 BZ. 1 HOrd !
Dijî êrîşên Roma, di bin serokatiya Krêzos de, şerr kir. Di 37 B.Z. de mir. 18 sal hukm kir.
DEWLETA ARŞAKIYAN : 132 B.Z.
Pismamê Mihirdad 1, Agtrşak, bû waliyê Ermenistanê, ku perçeyek ji dewleta Aşkaniyan bû. Navenda wî bajarê Erdiş bû. Piştî mirina wî, kurê wî Arşek bû waliyê Erdiş.
132 B.Z. 1 Arşek
Arşek şerrê Pont kir û ew ragihand Ermenistanê. Ji Ermenistan û Pont dewleteke nuh, bi navê Arşakiyan, danî. Di 114 B.Z. de mir. 18 sal hukm kir.
114 B.Z. 1 Erdesîs
Kurê Arşek. Şerrê Aşkaniyan kir û bajarên Amed {Diyarbekir>, Serê Kaniyê (R'as El-Eyn), Ruha (Urfa) stendin. Nuseybîn kir paytextê xwe. Di 89 B.Z. de hat kuştin. 25 sal hukm kir.
89 B.Z. 1 Dlkra.n@ Mezin
Kurê Erdlşîs. Şerrê Selefke kir û paytextê wan Antakya stend. Piştre, bi Roma re şerr kir û ew şkand. Di 71 B.Z. de, Roma ew li Diyarbekirê şkand û bajêr têk da (xera kir>. Di 66 B.Z., Dikran dijî Pompeyus, serleşkerê Roma, şerrekî mezin kir û hat şkestin. Piştî vê şkestlnê, dewleta Arşakiyan hêdî hêdî hunda bû.
- 310 -
2- PIŞTI ZAYîNA ISA
226 P.Z. SASANIYAN
Vê imparatoriyê 426 sal ajot. Gelek mezin, xurt û şehrevan {medenî> ba. Avakerê wê, ErdJşîrt Babeki, ji nifşê Key Kubbadê Kurd û Key Behmen ba, ango ji Kurdên Mad ba, ne Faris ba. Bi Roma re hergav li ser Gurcistan, Pont, Ermenistan, Kapadokya, Lîdya û Mêzopotamya Jorîn şerr dikir.
28 padîşahên Sasanî heban. Ên navdartirîn : Erdişîrt Babeki, ŞapQr 1, ŞapQr Il, NQşîrewan.
226 P .Z. .:. Erdisîrt Babeki

Di 226 P.Z. de, wî bi padîşahê Aşkaniyan ê dawîn, Erduwan, re şerr kir û ew kuşt. Padîşahiya Aşkaniyan hunda ba. Erdişîr padîşahiya Sasaniyan danî.
Şerrê Roma kir û şkest. Di 233 P.Z. de hemî Mêzopotamya ket destê Roma. Di 240 de mir. 14 sal hukm kir.
240 P.Z . .:. ŞapQr !
Kurê Erdişîrê Babekî. Şerrê Roma kir û di 244 de Mêzopotamya, Îbîrya, Ermenistan, Kapadokya, Antakya û Hums ji destê wan stendin. Piştre Kîlîkya (Adana) û gelek ciyên Sûriyê stendin.
Di 260 P.Z. de, piştî şerrekî mezin, Roma li nêzîkî Urfa hat şkestin û Imparatorê wê Valêryen hat dîl kirin. Di 271 de mir. 31 sal hukm kir.
310 P.Z . .:. ŞapOr Il
Kurê Hurmuz Il. Gava ku ba padîşah, hîn zarok ba. Şerrê Roma li Çiyayê Sincar kir. Piştre, Imparatorê
- 311 -
Roma Nuseybîn muhasere kir, lê nikarî bû bistîne, vegeriya. Piştî wî, Imparatorekî din ê Roma, Julyanus, Şapûr vegerand heta Mûsilê. Lê paşê, julyanus aşîtiyê kir. Nuseybîn teslîmî Şapûr kir. Lê Diyarbekir ji Roma re ma. Piştre Şapûr êrîşî Diyarbekir kir 0. bajêr têk da.
Imparatoriya Roma bû du perçe : ya Rojava, paytextê wê Roma bû. Ya Rojhilat, paytextê wê Istanbul bû û navê imparatorên wê Kayser bû. Piştre navê vê imparatoriyê bû Bîzans. Kayserê Bîzans êrîşeke mezin li Şapûr Il kir. Şapûr leşkerê wî kişand heta Medayin û ew perîşan kir. Kayser reviya Istanbûlê.
Şapûr nêzîkî 50 sal bi Roma û Bîzans re şerr kir 0. ew qewirandin. Di 380 P.Z. de mir. 70 sal hukm kir.
531 P.Z. 1 Ndsirewan
Ew padîşahê 20mîn e û ji hemiyan blrûmett.ir (qedr> e. Loma bi navê Nûşîrewanê Adil hat nasîn. Wî Roma, Tirk û Hindî şkandin. Şam, Anbar û Qefqasya stendin. Sînorên dewleta xwe gihandin sînorên Tirkistan 0. Hindistanê. Di 562 de, Kayser justisyanus bicarek şkest. Nûşîrewan di 579 de mir. 31 sal hukm kir.
3- PIŞTI ISLAM~

922 = 1240
7 DEWLET:eN KURDI (di dema Abbasiyan de)
1- LORe MEZIN (Fadlewiyan) : 922 P .Z.
Piştî leyandina Ereban di 620 de, Xanedana Fadlewiyan
- 312 -
ser hilda û li Loristan û dora wê (başûrê Kurdistana Îranê) dewleteke serbixwe danî. SOO sal ajot. 3S padîşahên wê hebûn.
2- AXŞADIYAN : 993 P.Z.
Li Şamê serrast bû. Li Sûriya û Misrê 40 sal ajot. 4 padîşah jê derketin.
3- DtLEMIYAN <Peweye) : 940 P.Z.
Li Bexdadê ava bû. Elî Imad El-Dewle, ji Kurdên Dîlemê, ew danî. Li Îran û Iraqê, heta hatina Selçûkiyan padîşahî kir.
4- HESNEWIYAN : 981 P.Z.
Hesnewî, kurê Huseyn, ji Şehrezorê (Suleymantye), ev dewlet li Şehrezor û Demar ava kir. Leşkerê xelîfeyê Bexdadê şkand. Vê dewletê 141 sal ajot. Di 1122 P.Z. de, bi destê Tataran hunda bû.
5- MER WANIYAN : 1009 P.Z.
Ehmed, kurê Merwan (Nasir El-Dewle), ew li Amed <Diyarbekir> danî. S2 sal padîşahî kir. Dewleta Merwaniyan 91 sal ajot. S padîşah jê derketin.
6- EyyOBIYAN : 1177 P.Z.
Avakerê wê, qehremanê Şerrên Xaçparêzan, Selaheddînê Eyyûbî : Kurdistan, Ermenistan, Sûriye, Misr û Yemen stendin.
7- XORISTAN Q SISISTAN : 1240 P.Z.
Piştî êrîşên Cengîz Xan bi çend salan, Şemseddîn Muhammed padîşahiyeke kurdî li Xoristan û Sîsistan ava kir. 130 sal ajot. 8 padîşah jê derketin. Di 1370 de, bi destê Timurlenk hunda ba.
- 313 -
MIRIY:eN KURDAN DI BIN ABBASIY AN DA
39 MIRI :
1- Erdelan (Kelhor)
1. a) Pilingan b) Derteng C) Tahîdest
2- Siyahmensûr 3- Cengî
4- Zengene

5- Pazûkî
6- Somay
7- Sehran (Soran) 8- Mahmûdî
9- Mukrî
10- Baban
11- Biradost
12- Behdînan
13- Hekkarî (Sîno) 14- Mikis
15- Bedlîs
16- Mûş
17 - Sipayerd
18- Sasûn (Hezo)
19- Botan : a) Azîzan b) Gurgîl c) Fenik 20- Hesenkêf
21- Sêrwan : a) Kufra b) Kefrî c) Iron 22- Xerzan
23- Farqîn
24- Zirkî : a) Derdin b) Gurdkîkan c) Hatax (Licê) d) Tercil
- 314 -
25- Batman
26) Qulp
27) Cebaqçûr
28) Gênc
29) Mirdasî : a) Egil b) Palo c) Çêrmûk 30- Siwêrek
31- Çemîşgezek : a) Mencîkurd b) Pêrtek c) Sekman 32- Koçhîsar
33- Dûrik
34- Egîn
35- Rişwan
36- Entab
37- Kilîs
38- Mendêlan : a) Mêrdin b) Qesrîk 39- Sorikan
* * *
XANEDA~N KURDI u IRA~
1- SEFEWIYAN: 1501 P.Z.

Şêx Ismaîl, kurê Şêx Seyfeddînê Erdebîlî, li Geylan (Kurdistana Iranê) serokê olî (dînî> yê Kurdan bû. Tevî murîdên xwe êrîş kir Gurcistanê. Piştre, di 1500 P.Z. de, padîşahê Akkoyunluyên tirk şkand û kuşt. Piştî salekê, di 1501 de, êrîşî Tebrîzê kir, xwe padîşah îlan kir û serxwebûna dewleta xwe anî.

Şêx Ismaîl bû Şah Ismaîlê Sefewî. Ew Kurd bû, ne Faris bû. Wî Xoristan, Hemedan, Bexda, Diyarbekir û Maraş ji Akkoyunluyên tirk û Sinendej û Kermanşah

- 315 -

ji rruren Kurdan stendin û dewleteke mezin ava kir. Mezhebê şîî kir fermî (resmî). Paytextê xwe jî kir Tebrîz (li Îranê>' Di 1524 de mir.

Ji sedema du çewtiyên wî : stendina Sinendej û Kermanşahê ji destê Kurdan û fermîkirina mezhebê şîî, hemî mîrên kurd dijminayiya wî kir û di şerrê Çil-Dêran, ku di navbera wî û Sultan Selîmê tirk di 1514 de çêbû, de bûn hevalbendên Sultan Selîmê sunnî.

Bi vî awayî, Kurdistan ji sedsala 16mîn heta ya 19mîn bû du perçe : di navbera du imparatoriyên islamî de, yek tirk û sunnî û yek îranî û şîî.

2- XANEDANA PEHLEWt : 1925-1979 P.Z.

Avakerê wê, Riza Xanê Pehlewî. Xanedana Kaçaran ku li ser textê Iranê bû daxist û xwe şah îlan kir. Ew Kurd bû, ne Faris bû. Ji êla Mezindiran bû, Pehlewî, yan Pehleyî, ango ji navçeya Pehle. Di zemanê Madan da, ji navçeya Tehran û Isfehanê re Pehle dihat gotin. Zaravê pehleyî yek ji zaravên Medan bû. Di zemanê Sasaniyan de, ew bû bû zimanê fermî. Ev xanedan di 1979 de, bi destê Ayetullah Khumeynî, di dema şoreşa islamî de, hunda bû.

* * *

4- DI SEDSALA XXmîn DE

al ÇE-ND BOYERaN DIROKl TI:N GIRING 1920 1 Peymana Sêvr

Civata Neteweyan (Soclêtê des Nations) biryar

- 316 -

stend ku serxwebûnê bide perçeya Kurdistanê ku di bin destê Imparatoriya Osmanî de ba (ango, Kurdistana Tirkiye, Iraq 0. beşek ji ya Sûriyê).

19231 Peymana S@vr
Civata Neteweyan biryara xwe ya jorm kişand, ji bo ku Tirkiye 0. Ingiltere (ku Iraq vegîrt.ibû 0. dest danî ba ser petrola Mûstlê) dijî wê derketin. Piştî vê Peymanê, Kurdistan ji aliyê Ingilîz 0. Fransiyan di çar perçan de hat beş kirin.

1. b) KURDISTANA IRAQ~

1922 = 1923 1 ~ MehmQ.d Berzencî Q. navçeya
kurdiYA. otonom

Di 24. 11. 1922 de, Ingilîzan, ku Iraq vegirti ba, 0. hukûmeta Qral Faysal ji Rêxistina Neteweyên Yekbûyî "ONU" re bi awakî fermî da nasîn ku mafê otonomiyê didin Kurdistana Iraqê. Wan vê yekê kir ji bo ku ferzend nedin Mustafa Kemal "Ata TUrk" ku dixwest Mûsrlê girêbide Tirkiyê 0. ji petrola wê kelk bigire. Şêx Mehmûd Berzencî xwe walî îlan kir, pûlên malî weşandin û rojnameke kurdî derxist. Lê, di 3.10.1923 de, Ingilîzan Suleymaniye bombe kir 0. Şêx Mehmûd reviya Iranê.

19741 Melle Mustafa Berzani Q. Kurdistana Otonom Piştî şerrekî xwînî 0. gelek dirêj ku di 1961 de dest pê kir, Kurdan beşek ji Kurdistan Iraqê, 35.000 km2, ji leşkerê iraqî stend 0. li ser wî axî otonomiyeke rast 0. fireh danî. Ji dema Komara Mehabadê ya Kurdistana Iranê ku di 1946 de ava ba, Kurdan mafekî ewqas mezin ne stendi ba. Wan hukûmetek di bin serokatiya Samî de danî. Neh wezaret tê de heban 0. xebateke ceddî dikir. Paytextê wê Hac umran ba. Lê, di 6 Adar 1975 de, Iraq 0. Iran li

Cezair, di crvma OPEP "Rêxistina Welatên Xwedî Petrol", li hev hatin 0. bi hev re Kurdistan bicarek pelixand.

19921 Pisti Şerr@ Xelîc. Kurdistana niv-serbixwe Piştî êrîşê Saddam Huseyn li Kuweytê 0. Şerrê Xelîc ê mezin, Kurdên Iraqê 3/4 axa xwe kontrol kir 0. heta nuha jî dikin. Wan di 19.4.1992 de hilbijartin çêkir : 105 parlementer ku 5 ji wan fille ban bijart. Di 16.6.1992 de jî hukûmetek ji 16 wezîr hat danîn. Ji van wezîran 1 jin 0. 1 Asorî ne. Ev bûyera mezin dilê hemî Kurdan gelek şah dike, li gel rewşa aborî ya gelek giran ku Kurdên Iraqê tê de dijîn.

1. b) U SO~TISTA~ NAVÇEYA KURDI YA OTONOM 1923-1929 1 Kurdistan Sor

Di 1923 de, di dema Lênîn de, di nav sinor@n Komara Sosyalîst a Azerbaycan@ de - di navbera Karabax Q. Ermenistan@ de - navçeyeke otonom ya kurdî bi navê "Kurdistan Sor" ava ba. Paytextê wê Laçin ba. Şaredariyên wê : Kelbajar, Gubaltî, Kurd-Aci, Murad-Xelîl 0. Kara-Işlax. Xwendegehên kurdî vebûn. Rojnameyek bi navê "Kurdistan" 0. pirtûk hatin weşandin. Enstituyeke pêdagojîk 0. rêxistinên çandî li bajarê ŞQ.şi vebûn.

Lê, mixabin, di 1929 de, Stalîn ev navçe rakir 0. Kurdên wê sirgûn kirin Kazakstan 0. Tirkmenistanê. Ronakbîrên kurd hatin mehkeme 0. îdam kirin. Di 1944 de, alfabeya kurdî ya bi tîpên latînî, ku di 1928 de hati ba danîn, bi tîpên kîrîlîk hatin guhertin.

1. c) KURDISTANA ~

1946 1 Qazi Muhammed Q. Komara Kurdi :I!!. Mehabadê Di 1941 de, di dema Şerrê Cihanê yê 1mîn de,

leşkerê sovyêtî bakurê Kurdistana îranê vegirt (işgal kir) û hevalbendên wî yên ingilîzî jî başûrê Kurdistanê stend. Di navçeya navîn a di navbera her du leşkeran de valayiyek çêbû û Kurdan karî bû xwe pêk bînin û dewleteke piçûk a serbixwe deynin. Komela Jiyanî Kurd, û piştre K.D.pJ., hatin ava kirin. Di 22.1.1946 de, Qazî Muhammed bû serokê Komarê. Ji aliyê siyasî, idarî û civakî gelek pêşveçûn bû. Kurdî bû zimanê fermî yê sazende û xwendegehan. Radyo, pirtûk, kovar ... bi kurdî hatin weşandin. Lê, di 17.12.1946 de, leşkerê îranê hemî endamên hukûmeta kurdî girtin û di Adar 1947 de hatin mehkeme û îdam kirin. Vê Komara Kurdî bitenê salekê ajot.

T1:GIHANDINA HIN GOTIN1:N NIVIsKAR BI (*)

(*) Nivîswar : pirtûk, kitêb (*) Newîd : soz

(*) Engîz : sedem, sebeb (*) Gertev : bûyer, hadise (*) Hengam : dem, zeman (*) Ano: ango, yanî

(*) Debistan dibistan, xwendegeh, mekteb (*) Leyandin vegirtin, işgal

(*) Enzan : mirov, insan
(*) Nivîswargeh : pirtûkxane
(*) Kişwer: navçe, mentiqa, welat (*) Hawiş : gel
(*) Pes : teslîm
(*) Mîna weka
(*) Balyoz : sefaretxane
(*) Konevanî : dîplomasî
(*) Rewan : can, ruh
(*) Şep : ferzend, firset, mecal
(*) Weşbest : helbestvan, şair
(*) Nebexetî, deha (erebî) : jîrbûna mezin.
(*) Firawan : nîmet
(*) Hulûlk : kole, ebd
(*) Zexelî: lîz, hîle
(*) Cawbirr : meqes
- 321 -
NJŞANK
(1) Nivîswara Emîn Zekî Beg bi lehçeya soranî - lehçeya Suleymaniye - hatiye çap kirin. Paşê, bi awakî durust û sade, ronakrewan (merhûm) Muhemmed Elî Ewnî Begê Siwêrekî ku li Misrê cî girtibû ew vegerande Erebî.
Ronakrewan Muhemmed Elî Beg hevalekî me yê hêja bû, ji Universita "Camî El-Ezher" guwahnave girtibû. Di Seraya Misrê da li ser nivîsan û wergerkan (tercume) bû. Lehçeyên Kurmancî, Soranî û Zazatî zanîbûn. Erebî, Farisî, Tirkî û Ingilîzî jî pir baş zanîbûn.
(2) Enzan pirseke kurdî ye. Ereban ji Kurdan stendiye, kiriye "insan".
(3) Zanayê dîrokê, Hakkî Paşa yê Tirk, ji bo ola Zerdeşt di nivîswara xwe, Ibrahim Hakki Tarihi, da, rûpel 119, ewha dinivîsîne: "Di mezhebê Zerdeştiyan da, kesê ku ji bo pêşveçûn û dewlemendiya welatê xwe û ji bo Qenciya enzanî bixebite pir bi rûmet e. Cot kirin, tuxum çandin, bax û baxçe çê kirin qenciyek pir mezin bû".
(4) Dîroka Ibrahim Hakki, derpêç (cild) 1, rûpel 66:

"Di dema dirêjkirina Misriyan da, ev kişwer (arazî) - Sûriye - di destê hawişekî (qewm), ano Kûtî, ku milletekî mêrxas û dijwar bû, da bû".
(5) Navê rast û kevn ê Azarbaycan "Aderbanan" bû. Paşê Ereban kir Azarbeycan. Aderbanan, yanî pasebanê agir. Di dema Zerdeştiyan da, li Aderbanan agirgehek mezin hebû.
(6) Kûtiyan bitenê xwehermenda Kûtiyûm li Mêzopotamya, ano di erdê Akad, Sûmîr û Elaman da, serrast ne kiriye. Belkî Kûtiyan ji Araratan ta Deryayê Sipî û Sûriya xwehermend, fe rwe rî û miriyên din serrast kirine.
- 323 -
(7) Tûranî jî Arî ne, ne Mongol in, ano Tûranî ne pismamên Kurd û Paris in. Pismamên Tirk, Tatar 0. Mongol nîn in.
(8) GROUSSET Rene, Histoire d'Asle, rûpel 16.
(9) Waşokanî = Weş-Kanî = Kaniya xweş. Mîtanî çawa Kurd bûn, navê paytextê wan jî bi kurdî ba. Rojhilatzanan sûda (mana) Waşokanî fehm ne kiriye. Loma gotine em nizanin ev bajar li ku ye ! Waşokaniya kevnare "Serê Kanî"ya îro ye. Iro ev bajar li Sûriya ye, bajarekî biçûk e , li ser Çemê Xabûr e. Ji wêranezarê wê yê fireh têtе zanîn ku ev bajar berê Pay textekî mezin bû. Serê Kanî = Ras EI- Eyn (erebî>' Iro jî ew wargeha Kurdan e.
(10) CONTENEAU Georges, Les civilisations anciennes du Proche-Orient, Presses Universitaires de France.
(11) Hêrêdot ji vî hawişî ra ne gotiye Alarod. Alarod navê ciyê wan e. Ji Ararat ra Alarod digotin. Kesên wî Xaltî bûn. Navê ciyê wan Alarod bû. Vê paşiyê, navê ferweranê xwe jî kiribû Alarod. Alarod ne bitenê ciyê Xaltiyan bû. Ew ciyê gişî Kurdan bû, ciyê Sûbariyan bû; hîn rasttir, ciyê Kûtiyan, ano bapîrên Kurdan, bû.
(12) Di vê hengamê da, li Madistan mîrên jêrîn ferweranî (hukumdarî> dikir :
Astîbars, Heştîbors, Mandos, Menclk, Suzarmos, Aspada, Artîka, Astîka, Arbiyan, Armî, Arten, Parlsûnd, Artenî, Arjeng, Arbas.
(13) Tarîxa Pîrniya, rûpel 15. Tarîxa Milelê kevnar ên Rohilat, rûpel 378. Tarîxa Ayine î Iskender, rûpel 118. Tarîxa Qedîm a Oraman, rûpel 118.

(14) Di van salan da, rohilatzanên arkêolog nivîs tek û nehrevanên nû peyda kirin. Ji van kevnerêçan xuyabûye ku Sît Endo- A wropayî ne 0. birrekî Kurd in.
(15) Tewrat, Nivîswara Estir, faslê tim, nivîs wara dîrokên kevnare yên kurdî ...
- 324 -
(16) Ev gertev, ano guhartina Bileser bi kurê Camas, Kûrîş , nîşan dide ku Babîl di bin ferweraniya Key Behmen da bû.
(17) Dîroka Merdûx, derpêç 1, rûpel 135 : "Di dema padîşahiya Kûrîş da, paytextê Mad Hemedan bû. Paşê paytextê Mad bû Isfahan. Di nivîspelgeha (def terxane) Ispehanê da, ji bo hêvisandina (tamîr) deregahê pirfiraz (beytîmuqeddes), fermana Kûrîş bi dest ket. Di vê fermanê da, navê Karîş padîşahê Mad hatiye nivîsandin".
Tarîxa Merdûx, derpêç 1, rûpel 180 : "Tewrat di kitêba Ezra, fasl 6 da, ji bo paytextê Kûrîş paytextê kişwerê Mad nivîsandiye".
(18) Leşkerên yewnanî ku bê serleşker mabûn ji xwe ra Ksênofon (Xênophon) general bijart. Ji leşkerên yewnanî deh hezar peya jîndar mabûn. Ksênofon ev deh hezar leşkerên mayîn bi hezar êş û tengayî ji çiyayên Kurdistanê û ji Armênya derbas kirin û ew gihandin rexê Deryayê Reş. Paşê ji rexên derya çûn 0. ji geliyê Istanbûlê derbas bûn, gihîştin welatê xwe.
Li bin fermandariya Ksênofon ev vegera 10.000 Yewnanî di nivîs warên dîrokan da bi nav û deng e. Di dîrokan da ji vê vegerê ra "vegera deh hezaran" dibêjin. Li ser vê vegerê, Ksênofon di 400 B.Z. da nivîs warek nivîsiye û navê nivîswara xwe kiriye "Vegera deh hezaran". Ji bo Kurdan dûr û dirêj pir tişt nivîsîne : di heft rojan da, ji Kurdistanê derbas baye, navê Kurdan kiriye "Kardux", çima ku di wan deman da navê wan dora Kurduwan bû. Di devê Yewnanan da, "Kurduwan" bûye "Kardux".
Gellek gel hene ku 5 û 6 navên wan hene. Ez heft navên Yewnaniyan zanim : Yewnan, Yûnan, Exrik, Grêk , Hêlên, Rûm. Ksênofon ji bo Kurdan wuha dinivîsîne : "Kurd tîravêjên dijwar ban, tîrên ku Kardux diavêtin, me ev tîran ji xwe ra dikirin "javelo", (ano rimên destan). Kuştî û serêşaniyên heft rojan ji destên Karduxan, ji kuştî û tengayiyên

- 325 -
ku me di sê mehan ji destê ordiya Erdişîr dîtibûn bêtir bûn".
General Ksênofon di nivîs wara xwe da ji bo Kurdan çi nivîsiye. me ji we ra got. Îcar jî, li ser vê "Vegera deh hezaran", zanayê dîrokê yê tirk çi dibêje, em dê binivîsînin : Tarîxa Ehmed Refiq, derpêç 1, rûpel 39 : "Deh hezar Ispartî ji nav xwe Ksênofon kir serleşker. Ksênofon deh hezar Yewnanî ji Babîl, Asor, Ermenistan, ji nav Îran, ji zoriyan, ji welatê neyaran, bi karaşînayî, dûrbînî, ew derbas kirin û gihandin kenarê Deryayê Reş ... ".
Ksênofon di nivîs wara xwe da dibêje : "Ez ji welatê Karduxan derbas bûm, me pir kuştî dan, pir tengahî kişandin. Tîrên ku Karduxiyan diavêt.ine me, me ev tîran ji xwe ra dikirin "javelo", (ano rimên biçûk).
Ehmed Refîq Beg nabêje Ksênofon ji welatê Karduxan derbas bû. Ehmed Refîq Beg naxwaze navê Kardux, navê Kurd bîne ser zimanê xwe. Ew dibêje ji Babîl, Asor, Ermenistan derbas bûn! Ya Ehmed Beg ! Ya Refîq Beg ! Gava ku Ksênofon ji van deran derbas bû, Babîl, Asor, Ermenî mabûn ? Ji van deman du sed sal bertir, padîşahê Kurdan "Key Aksar" Asor wenda kiribû û padîşahê Kurdan "Key Xusrew" Babîl standibû. Ermenya jî kiribû satrapeke (wilayet) xwe. Di van deman da, sînorên imperatoriya Kurdistanê ji Hindê heya hundirê Hebeşistanê diajot.
(19) Dîroka Merdûx. derpêç 1, rûpel 178 : "Bi gotina Herodot, Parisiyan di welatê xwe da, ano li tengava Paris. pirtirên wan bi çandinî û şivantî karuwer bûn. Carna bi serxwebûnî jî jîne. Lê, pir caran li bin destê Pişdadlyan bûn, yaxut ji xwehermendên Mad, Asor û Kildan ra bac didan. Tucar ji erdê xwe derneketine".
Strabon, birr 13 : "Parisî li tenvaga (xelîc) Paris rûdiniştin. Heya wendabûna Mad, ji kişwerê xwe derneketine" .
- 326 -
(20) Iskenderê Mezin, kurê Fîlîp, qralê Makêdonya, xurt, zorbazû, şûrhingêv, mertalgêr û tîravêj bû. Di çekbaziyê da pir hunermend bû. Gellek bedenbaz û canbaz bû. Pir zana, xudançand (museqqef) û xwendemend bû : leşkervanî, kargerînî, nivîs vanî, fîlozofî ... di giş van danişmendiyan da destdirêj bû. Van zaniş û huneran ji zanayê dengîn

Aristo hîn bûbû. Belê, Iskender şagirdê Aristo bû. Iskender, pey mirina bavê xwe, bû Qral. Wê gavê bîst salî bû. B.Z. 336.
(21) Dîroka Merdûx, derpêç 1, rûpel 41 : "Ji serê kaniyên Dicle û Ferêt heya rexên Deryayê Paris, zimanê kurdî dihat peyivandin. Germiçanka vî zimanî berê Ararat bû, paşê Zagros, paştir Ispahan, paştir Hemedan û Medayin bû. Weha ye, em dikarin bibêjin li îrana kevn, ku Iskender tê da fermanwerî kir, zimanê kurdî zimanê gişkî bû".
(22) Dîroka Merdûx, derpêç 1, rûpel 41 : li (19) binêre.
(23) Roma, Imparatoriya nû û cuwan, Awrûpa giş vekirandibû. îcar doza cihangîriyê dikir, dest pê kiribû dirêjî Asya bike.
(24) Dîrokzanê bi nav û deng ê ingilîz, Sir Jan Malkin, di nivîs wara xwe da wuha dinivîsîne :
"Aşkanî ku ordiyên Y ewnaniyan ji pey hev şkandin, perîşan dikirin û ji hev dijendin, û ku serxwebûna îranê cardin bang kir, Parstawa bûn, ano Kurd bûn".
(25) Dîroka Saîd Paşa, Mîratî Îber, derpêç 1, rûpel 122-129.
(26) Qamûsa Şemseddîn Samî, Sasan : "Sasan bavê Erdişîrê Babekî ye. Erdişîr bingehdar û serekê Xwehermenda Sasaniyan e. Sasanî kirasê çarim ê Padîşahên îranê ne. Ew bixwe kurê Sasan e. Ji ezbeta Keyaniyan, Behrnenê Kurd ê Isfendiyar e. Pey ku Iskender îran vekirand, di pey mirina wî ra mîrî çê bûn. Wê gavê, bavpîrên wî li kişwerê Paris
- 327 -
dijîn. Ew şivanê yekî bû ku navê wî Babek bû û keça wî mar kiribû. Ji vê markirinê Erdişîr çê bû û bû Padîşah. Herçend ku ûda xwe li ser navê kalikê xwe "Babekan" kiribû, ezbeta padîşahiya xwe kir "Sasaniyan".
(27) Dîroka Merdûx, derpêç 1, rûpel 123 : "Abdullah Ibn Omer paşê çû Pawe, ev der jî bilêc kir û giş jin û keç û zaro bûn para leşkerên islamê. Fermandarê ereb, Abdullah Ibn Omer, avadaniyên mezin dan çê kirin, jin û keçên Kurdan xistin van avadaniyan. Meaz Ibn Cebel û bedewî bûn xwediyên van jin û keçan. Zarûk çê bûn û ezbet serrast bûn. Heya nuha jî Pawe û dora wê malbat û bavpîrên xwe digihînin Meaz Ibn Cebel û van bedewiyan".
(28) Tarîxa Merdûx, derpêç 1, rûpel 41.

(29) Dîroka Ibrahîm Haqqî, derpêç 7, rûpel 98; Şemseddîn Samî, Qamûsa Alam, rûpel 3835 : "Bingehdarê vê Padîşahiyê Şemseddîn Muhammed bû. Di sala 1240 P.Z. da, bingeha vê padîşahiyê danî. Kişwerên Hurad, Xorisan, Xerecistan, Sîsistan, Serbidaran di bin serdariya wan da bûn. Di 1370 P.Z. da, dawiya wan hat".
(30) Ji kevn da, ji gevera (mintiqa) navbera Zaxo û Sêêrt ra Botan dibêjin. Li Botan sê mîrî hene :
Azîzan, Gurgîl û Fenik. Wuha ye, Botan navê geverek e û tê da sê mîrî hene, bitenê navê yek mîrî nîne. Gotinên Mîrê Botan, Mîriya Botan ne durust e. Gotinên durust ev in : Mîriya Azîzan, Mîriya Gurgîl, Mîriya Fenik; û Mîrê Azîzan, Mêrî Gurgîl, Mîrê Fenik.
(31) Dîroknivîsên tirkî "Çel Dêran" kiriye "Çaldiran''. Lê rastiya vê pirsê Çel Dêran" e. "Çaldiran pirseke çewt e". "Çel Dêran" pirseke kurdî ye. Tiriya wê "Ktrk Kilise" ye.
(32) Dîroka Ahmed Ras im, rûpel 278 : "Şah Ismaîl di nîvê zivistanê da çar şandiyên xwe, bi diyariyên giranbuha, azadkirina jina xwe "Tach Harnm" hêvî
- 328 -
kir. Padîşah şandî avêt zindanê, jinik jî li "Kadi Asker Hldir Çelebi" mahr kir. Ev tevgera Selîm bi rastî ne hêja bû".
(33) Gelek beg û axa hebûn ku bi zexelî, nîrengî (desîse) û xapên Tirkan dixapiyan, û hin ji wan jî ji gelê xwe ra bêbextî dikir, zêr û dirav digirtin, dibûn dost 0. hevalên Tirkan. Xweşber, ev Beg û Axa jî wek van Şêx û Melan bêbext bûn. Ew jî şayesteyên (layiq) nefrînê bûn. Lê, pirên van Beg û Axan bi xapandina Şêx 0. Melan ev bêbextî dikirin. Loma, em bawer dikin ku engîzvanên rastîn Şêx û Mela bûn. Gunehkarên mezin ew bûn.
(34) Dîroka kevnare ya Enzanan pir tarî ye, pir kêm e û pir çewt e. Di van salên dawîn da, ji kolanên arkêolojîk pir nîşane 0. şope derketine meydanê. Bi van nîşaneyên nû çewtî û kêmaniyên nivîs warên dîrokên kevn hatine durust kirin 0. tekûz kirin. Di vê navê da, li ser dîrokên Kurd 0. Ermeniyan jî zanişên nû bi dest ketine. Bi alîkariya van nîşaneyên nû bûnlşên cografî 0. dîrokî yên Kurd û Ermeniyan em dê berjend (îzah)

bikin, em dê bixebitin, xwarî û çilweriyan bidin alî û rastiyê derxînin meydanê !
(35) Li Trakya, bi navê Frîjyen hevsiyekî Ermeniyan hebû. Di dîrokan da, ji bo nejadên her du hawişan ra "Trako-Frîjyen" dibêjin. Ji van berjendkirinên jorîn xuya dibe ku Kurd û Ermenî, her du jî Endo-Ewrupayî ne, lê ne yek birr in. Kurd ji birrê "Ariyan" in, Ermenî ji birrê "Trako-Frîjyen" in.
Ermeniyan çend hezar sal li Trakyayê derbas kirin. Paşê, di sedsala 6im B.Z. da, Trakya berda, ji Bosforê derbas bûn, kenarê Deryayê Reş girt 0. ber bi rohilat hatin, li dora Qars 0. Erlwanê cî girt.
Di wan hengaman da, ano di 625 B.Z. da, hawişê Sît ji bakurrê Deryayê Kaspînê ber bi nîvro dirêj kir. Sît Arî ne, ji Ezbeta Kurdan in. Sîtan, li ser riya xwe, Gurcistan, Armenya, Pont 0. Kapadokya

talan kirin, wêran kirin û ber bi Lîdya û roava kişiyan.
(36) Di nivîs warên dîrokên Ermeniyan da, ji bo Padîşahî û Padîşahên Ermeniyan nivîsandinên pir çelwerî (rnubalaxa) hene. Pirên van nivîsandinan xurû nîgaş in. Konevanên Ermeniyan, bi van koneva-niyên xwe yên çewt, ji gelê Ermenî ra ziyanên mezin gihandine û dikarin cardin jî bigihînin. Nemaza, gava cuwan û xortên Ermeniyan ku ev çilwerî xwendine û bawer kirine, sibê mezin bibin, bikevin jîna kar û xebatê, ev nîgaşên han dê bifirin, li roşimana (wazlyet) vêrast agah bibin ew dê bibin bedbext û bedbîn.
Hengama gûrîpaşiyên Ermeniyan ew gav e ku Ermenî li bin berbendiya Roma bûn û serleşkerên ermenî di bin fermandariya Roma da bi salên dirêj bi Kurdan ra şer kir. Carna ordiya Roma diket Kurdistanê, Ermenî jî bi wan ra ketine Kurdistanê û ji vê keysê behremend bûne û li hin koşeyên Kurdistanê bi cî bûne.
Hem] (hatta), hin fermandarên jêhatî yên Ermeniyan carna ji Roma padîşahî jî çirpandine. Lê, di vêrastiyê da, ev tevger giş numayiş bûn. Ermenî berbendên Roma bûn û wan tucar padîşahiyeke tebût bi dest ne xistiye.

Ermeniyan, çawa li bin siya Roma li Kurdistanê ji bo çend rojan padîşahiyên nîvco bi dest xistine, ewha jî ji bo çend demên kin li Anadolê, li dora Çiyayên Torosan padîşahî kiriye. Ev padîşahî jî di dema Xaçparêzan da bi camêrî û alîkariya Awrûpayiyan bûn. Gava Xaçparêz şkestin û vegeriyan Awrûpayê, padîşahiya Ermeniyan jî herifî, çû.
(37) Ji bo vê kissê, di benda "Leyandina Ereban Kurdistan" da me dûr 0 dirêj nivîsiye.
(38) Eger hûn pirsa Ermenan dikin, di wan deman da Ermenî li roavayê Bosforê (Geliyê Istanbûlê), li Trakya rûdiniştin. Ermen 0 Frîjî hevsiyên hev bûn.
- 330 -
Ji wan ra "Trako-Frîjyen" dihat gotin. Ev her du hawiş bicîbûna Kurdan û serrastkirina xwehermend û şehriyariyên Kurdan bi 6000 sal şûnda ji Trakyayê derbasî Anadolê bûn. Frîjî li dora Qonyayê man. Ermen hatin dora Rewanê.
(39) Eger em baldar bin, dibînin ku her sê nav jî bi lehçeyên Kurmancî ne.
(40) Tarîhî Rîşeyî Kurd, rûpel 104.
(41) Dîroka Merdûx, derpêç 1, rûpel 175 : "Siwarên rêzanwer ên Kurdan di hunermendiyê da ji siwarên rêzanwer ên Asor serbesttir bûn. Ji bo ku siwarên Kurdan, di bezê da, bi hunerbaziyeke hêja tîravêjî dikir. Q cardin hespên Kurdan bi rindî û bez û çalakiyên xwe li cihanê deng daye".
Dîroka Ibrahîm Haqqî, derpêç 1, rûpel 120 : "Key Aksar , ji bo ku di kişwergîriyê da kamwer bibe, bi awakî bingehî rahişte kar û xebatê : Key Aksar leşkerê xwe pir baş rêzand û koq kir. Ji bo her çekî lekên cihê durust kirin. Ji bo her birrî fermandarên cihê danîn. Bi vî awayî, xwehermenda Mad û mêraniya gelê wî ku ji berê da naskirî ne bûn xwdiyên Ordiyeke tekûz û tebût".
(42) Dîroka Merdûx, derpêç 1, rûpel 188 : "Nivîs warên cihanê giş, di dîrokan da, ji vê wergerka hanê ra gerteveke hundurî gotiye Û wuha jî nas kiriye. Di hemdema Kûrlş bixwe jî da, ji vê X we he rmendê ra xwehermenda Kişwerê Mad got. Li Tewratê, di blrrê 6im da nivîsandiye".
(43) Şemseddîn Samî, Qamûsî Elam : "Sasan bavê Erdişîrê Babekî ye û ji ezbeta Key Behmen e. Bapîrên wî, gava ku Iskender îran veklrandlbû û

paşê mîrî çê bûn û di nav Farisan da mabû, ji ezbeta Key Behmenê Madî bûn. Bavê Erdişîr şivanê merivekî dara, bi navê Babek, bû û keça Babek mar kiribû. Ji vê mêrjiniyê (zewac) Erdişîr hat cihanê, bû Padîşahê Sasaniyan. Sernavê (leqeb) xwe ji bavê diya xwe stendibû, bûbû "Babek". Lê şehriya-

- 331 -

riya wî bû ser navê bavê wî, bû ya Sasaniyan".

(44) Şemseddîn Samî, Qamûsî Elam, Pehlewî :

"Pehlewî zimanekî kevn ê îranî ye. Di hengama Sasaniyan da bûbû zimanê fermwer (resmî). Ev ziman, gevera ku jê ra "Pehle" digotin - Rey U Isfehana îro. Yewnaniyên kevnare jê ra "Mîdya" nav dida - zimanê wan bû,

Di leyandina islaman da, ev ziman bicarek rabû, nivîzişê wî jî hat ji bîr kirin. Pey çend sadsalan, gava ku Îraniyan dest pê kir zimanê xwe bi tîpên erebî binivîsînin, bi Iêhatlnek (tesadufî} zimanê gevera Faris, ano Farisiya îro, pêş ve çû U bû zimanê wîjeyî (edebî) U nlvîztşê".

(45) Ihsan NUrî, Tarîxî Rîşeî Nejadî Kurd, rûpel 97:

"Merhûm Serdar Nasir Elî Sincabî dibêje : "Min li ba Abdullah Xanê Qoç ê Mîdixem, ji Sultanê Kelhor, nivîzişek dît ku keça Yezdî Kurd (Padîşahê Sasaniyan ê paşîn) Şehirbanû Xatûn, ji bavê xwe ra nlvîsandlbû, Di vê nlvîzişê da digot : "Babo, ruyê te reş be ! Bo çi namê î Peyxember pare kerdî" , ku bicarek Kurdî bû".

(46) Maurice Pernot, L'Inquiêtude de l'Orient en Asle Musulmane, rûpel 113 : "Nûrultah - zanişmendek ji Şîrazê - dibêje : "Pir caran hatiye gotin ku ola islamê bi darê zorê bi me dane pezirandin. Lê, ez bawer im ku rastî bi awakî din e. Parisiyên Zerdeştî ji Erebên kişwergîr pirsîn : "HUn bi kî baweriya xwe tînin T", Q Ereban li wan vegerand : "Em bi Xudanekî yekta, pir pak U pir firaz baweriya xwe tînin, ku bi şandiyekî, bi pêxemberekî bi me hatiye nas kirin". Farisan weha qêr kir : "Baweriya me jî wek baweriya we ye".

Di nav bera her du olan da cudadiyeke pir tu nebû. Paris giş zûka bûn misilman".

(47) Nivîsbêja (meqale) zanayê Fransiz, Maurice Pernot, rûpel 243.

- 332 -
(48) Li (44) binêre.
(49) Pirsa "Pehlewî" ji du birran çê baye : "Pehle" û "wî". "Wî" erebî ye. Ereb jê ra "wawê nisbî" dibêjin. Bi kurdî "î" ye. "Pehlewî" bi erebî mensûbê "Pehle" ye. "Pehleî" bi kurdî sendeyê "Pehle" ye. "Pehlewî" çi ye ? Di hengama Madan da, ji dora Tehran 0 Isfehanê ra Pehle digotin. Ev der giş welatê Mad ban. Di nav zaravên (şîwe) Madan da, zaravê Pehle şêrîntlrê gişan ba. Di dawiya Sasaniyan da, zaravê Pehle, şêrîntlrê zaravên Kurdan, ba zimanê fermwerî.
- 333 -
PEYNA VEYi:N NIVîsw ARAN i:N BERGERIŞ (MURACEET)
"ÇAVKANÎ"
ROJHILA Tî (farisî, erebî, tirkî) ABAD Fîrûz, Qamûs ,
ALOsî ZADE, Rûhul meanî.
AYETULLAH Aqa, Tarîxî Merdûx, 1906, Tehran. Asarî Acam.
Awîsta.
Ayîneî Iskender.
BEDLîsî Şerefeddînê, Şerefname. BEG Feyzullah. Tarîxî Kurdistan. Burhanîqatî.
Cemî' el-ensab.
DEHLAN S. A., Futûhat el- islamiye. Debis tanul-rnezahlb.
Dewleti Osmaniye tarihi.
EBUL FIDA, Teqwîm el- buldan. EL-MELEK Sadiq, Hedîqe Nasirî. EWLIYA Çelebî, Seyahetname. El-f'eth qesî fî feth el-Quds. El-tesqîb.
FIRDEWSY, Şahname.
FRûXY, Tarîxî milelî qedîmeî şerq. Farisname.
HACî Xelîfe, Tarîxî cihannuma.
- 335 -
HEMEWÎ Yaqût, Mu'cem el-buldan. KIHAN M., Coxrafiyaî mufassal Îran. Kurd der muqabilî Turk.
IBN EBÎ DEBER, Qesîdatul umem. IBN ESÎR, Tarîx el-kamil.

IBN HEWKEL, Dîwan el-sedaqe. IBN HEWKEL, Mesalik el-memalik. IBN MESKUYE, Tecarub el-umem. IBN ŞEDDAD, Sîretu Selaheddîn. IBN WEHŞIYE, Şewq el-musteham. HEMDULLAH, Tarîxî guzîde.
MELLA Abdullah, Tarîxî cedîdî Greman. MELLA Qadirî, Tarîxî qedîmî Greman. MELLA Şerîf, Behceî Mistafawiye. MELLA Şerîf, Teqwîm el-tewarîx. MELEK Sadiq, Tarîx el-Ekrad.
MESûDÎ, El-tebîne.
MESûDÎ, Murewic el+deheb. MUSTEWFÎ H., Nuzhetul-qulûb.
Mealim el -usûr el-wusta.
Mecme' el-tewarîx.
Mecme' exbar Kurd.
Me'rlfet şehriyarî Oramî.
Mesalik el-ebsar.
NECM EL-DEWLE, Kifayet el coxrafî. NESÎRÎ, Eşq we saltanat.
NÛRÎ PAŞA Ihsan, Tarîxî nejadî Kurd.
- 336 -
Neîma tarihi. Nuxbetul-ezheriye. PAŞA Cevdet, Tarîx.
PAŞA Said, Ismail Hakki tarihi. PÎR ORAMÎ Camas, Camasname. PÎRNIYA, Tarîxî Îranî qedîm. RASIM Ahmed.
REFIQ Ahmed, Tarîxî umumi. Rawdatul-safa.
SAMÎ Şemsuddîn, Qamûsî E'lam. SULTAN Memdûh, Tarîxî umeraî Ekrad.
SUWEYDI, Sebaik el-zeheb.
ŞEREF Abdurrehman, Tarîxî umûmî,
Dr. ŞÎRKUH Bele, El-qeziye el-kurdiye. T ABARÎ, Tarîxul-umern wel mulûk.
TUDARÎ Seyid Ebd Semed, Nûrul+enwar. Tarîxî el+umeraî Abbasî.
Tarîxî mantiqî.
Tarîxî umûmî muerrixîn.
Tewrat.
Tuhefetul-edeb fî tewarîx el-ensab. Tarîxî Sînan.
WECDÎ, Dairetul-mearif.
XADARI, Tarîxul-umemll-Islamlye. ZEKÎ Emîn, Tarîx.
EWRUPÎ:
Ansîklopêdiya Almanî.

- 337 -
Ansîklopêdiya Fransizî. Ansîklopêdiya Ingilîzî.
BEIDAR Paul, Acrumîyeî Kurdîye (Grammaire kurde), Paris 1956.
BEASTED james Henry.
BINDER Henri, Au Kurdistan, en Mêsopotamie et en Perse, Quantin, Paris, 1887.
CHAMPDOR Albert, Saladin, le plus pur hêros de I'Islam, Albin Michel, Paris, 1956.
CONTENEAU Georges, La civilisation des Hittites et des Hurrites du Mitanni, Payot, Paris, 1948.
CONTENEAU G., La civilisation d'Assur et de Babylonie, Payot, 1951.
CONTENEAU G., La civilisation iranienne, Payot, Paris, 1952.
FREU Roks.
GIAMIL, Monte Slngar, Roma, 1900. GRAUSSET Rene, Histoire de l'Asie.
HOLL M.
HERODOT, Hlstoire d'Hêrodote, Paris, 1894. jERNIEK joseph.
MIGERSON.
MIST AER Dare.
NIKITINE, Les Kurdes, C.N.R.S., Paris, 1955. NORMAN.
PERNOT Maurice, L'inqulêtude de l'Orient. RUTTEN Margueritte, Babilon.
SIR MILKIM john.
SIR SMITH Sidney.
- 338 -
SPEISER, Dr Ephraim A.; Southern Kurdistan in the Annals of Ashurnasirpal and today; in Annals of American Schools of Oriental Research, vol. VIII, pp. 1-33, New Haven, 1926-1927.
STRABON, Oeuvre gêographlque. 60 av. J.-C.
SIR SYKES Mark, Journey in North Mesopotamia, London, 1907.
SIR SYKES Marc Percival , The Kurdish tribes of the Ottoman Empire; in Journal of Anthrop. Inst., vol. 38, pp. 451-486, London, 1908.
SIR SYKES Marc Percival, A history of Persia, 2 volumes , Ed. Macmillan. London, 1915.

- 339 -

JÎNENÎGARIYA EKREM CEMÎL PAŞA

Ekrem Cemîl Paşa li Diyarbekirê, di 1891 de, bû. Di 1912 de xwendina xwe li Stembolê, li Sultani Lisesi, qedand. Di wê salê de wî, tevî meriv û hevalên xwe, rêxistina Hêvî danî. Vê rêxistina xwendekaran rojnameyên Rojî Kurd û Hetawi Kurd derxistin. Piştre ew çû Ewropayê ji bo xwendina bilind. Berê li Zanîngeha Lozanê, li Swîs, û piştre li ya Gand, li Beljîkayê, hendese xwend. Ew li Lozanê bû berpirsiyarê Hêvî. Di 1914 de, gava Şerrê Cihanê yê 1mîn dest pê kir, ew neçar bû ku vegere Stembolê. Di şerrê Rûsyayê de bû topçî. Di 1918 de, li Diyarbekirê bû serokê KUrdistan Cemiyeti. Piştre, bavê wî, Qasim, ev serokatî kir. Şaxên vê rêxistinê li gelek ciyên Kurdistana Tirkiyê zû vebûn. Rojnama wê Gazi bû. Di 1919 de, Mustafa Kemal û hevalên wî yên Ittihad ve Terakki Cemiyeti ew neçar kir ku ji Diyarbekirê bireve Stembolê. Li wê derê, alîkariya hevalên Kurdistan Teali Cemiyeti û rojnama wê Im dikir û di rojnamên tirkî de dinivîsî. Xwendekarên Zanîngeha Stembolê ew kir serokê fexrî yê Hêvî. Di 1920 de, piştî Peymana Sêvr, KUrdistan Teali Cemiyeti ew şand Kurdistanê. Lê, li wê derê, Ata- TUrk gelek propaganda dijî Kurdan kiri bûn, loma ew neçar bû ku cardin vegere Stembolê. Di rê de, Abdulkerîm, axayê gundê Çêlikê Eliyê Remo, nêzîkî Midyatê,

- 341 -

ew teslîmî Tirkan kir. Di 1922 de, vegeriya Diyarbekirê. Heta 1925, tarîxa serhildana Şêx Seîd, li gundên bavê xwe Qasim dixebitî. Di 3 sibat 1925 de, li Diyarbekirê, li malê hat girtin. li girtîgeha Kastamonu 4 sal, ango heta 1929, ma. Piştre, tevî hin endamên malbata xwe, reviya Sûriyê. Berê li Helebê man. Ew der bû bû navenda rêxistina Hoybûn ku di 1927 de ava bû bû. Piştre, çûn Cezîrê - Kurdistana Sûriyê - û Şamê. Hoybûn alîkariya serhildana Çiyayê Agirî ya Ihsan Nûrî Paşa kir. Di 1932 de, tevî Celadet Bedir Xan û hevalên din, kovara kurdî Hawar li Şamê weşand. Ji 1940 heta 1946, Ekrem bû nimînendeyê Hoybûnê, Di 1962 de, çû Kurdistana Iraqê, ji bo ku rehberiya rojnamevanê Amerîkî Dana Adams Schmidt bike. Evê dawîn pirtûkek bi navê "Journey Among Brave Men" di 1964 de nivîsî û tê de gelek li ser Ekrem, di bin navê "Bavê Comerd" de, peyivî. Ji 1967

heta mirina xwe di 1974 de, piştî ku hukûmeta Sûriyê axên Kurdan stendin, li Şamê ma. Piraniya jiyana xwe li gundê Talikê, nêzîkî Dirbêsiyê, li Cezîrê derbas kir. Bi bexçevanî û hînkirinê, nemaze bi fêrkirina zimanê kurdî, mijûl bû. Wî kurdî, tirkî, farisî, fransî û erebî zanî bûn. Di 1972 de, ev pirtûk bi kurdî û piştre bi tirkî nivîsî. Bi pismamê xwe Qedrî Cemîl Paşa (Zinar Silopî) re li hev hat ku ew dîroka Kurdistanê ya kevn û Qedrî jî ya nûjen (Doza Kurdistan) binivîsin. Di 1973 de, jînenîgariya xwe bi tirkî "Muhtasar Hayatim" nivîsî. Li Şamê, di 1974 de, wefat kir. 83 sal jiya.

- 342 -

NAVEROK

Pêşgotin 3
Amerziş <Beyanê Ilzur) 5
Kurtebira Dîroka Kurdistan, Pêşgotin 7
Beşkirina nejadê enzan û Kurd ji kîjan nejadî ne 15
Kurd ji kê derê hatin Kurdistanê û çi gav hatin ? Kurd çend ezbet û bir bûn? Çawa erd fireh kir ?
Paşê çawa Imperatoriya Kurdistan wenda bû 27
Ferweriyên Kurdên Araratan : Lolobûm, Gûtiyûm, Kardûnya, Hûrî, Mîtanî, Nehrî, Mûşkî, Xaltî, Alarod 33
Ferweriyên kurd ên Kaspiyên Mannaî, Madê Biçûk
û Madê Mezin 61
Firehkirina Imperatoriya Kurd 83
Pey mirina Iskenderê Mezin, xwehermenda Selekos
li Kurdistanê 119
Wendabûna Şehriyariya Selefke li Kurdistanê, xwehermendên Kurdan
121
X wehermenda ku Aşek bingeha wê danî, X wehermenda Part an Aşkanlyan e ?
133

- 343 -

Şehriyariya Sasaniyan

Kurdistan di hengama leyandina Ereban da Standina Bexda û wendabûna Abbasiyan

bi destê Hulakû
137
153
Padişahiya Ismaîlê Safawî û serhatiya Kurdan 199
Yekîtiya Kurd û Tirk
Serhatiyên dilkuj ên Kurdan li bin destên Tirkan 203 Di sedsalên 19im û 20im da, Kurdistana Roava Hengamên Sultan Hamîd, Jan TUrkan
û Mustafa Kemal
221
Armenya li Asyaya Biçûk
Dasenda (Munasebet) Kurd û Faris
231
247
Kurteyeke kronolojîk
Imperatorî, dewlet û mîriyên kurdî
Têgihandina hin gotinên nivîskar bi (*)
299
321
Nîşank Çavkanî
Jînenîgariya Ekrem Cemîl Paşa
323
335
341
- 344-
WEŞANt;:N DIN ÊN ENSTITUYÊ
1) Bultena sêmehî ya agahdariyê, bi 4 zimanan kurdî, fransî, hollandî û ingilîzî.
2) Dossier Kurdistan, dosyeke li ser dîroka Kurdistanê û rewşa Kurdan a îroyîn ji aliyê siyasî, civakî û çandî, li welêt û li Ewropayê, bi fransî, 136 rûpel. Çapa 1mîn 1988, a 2mîn 1989 û a 3mîn 1992.
3) Dossier Koerdistan, wergerandina "Dossier Kurdistan" bi hollandî. Çapa 1mîn 1988, a 2mîn 1991.
4) The Kurdistan File, wergerandina "Dossier Kurdistan" bi ingilîzî, 1989.

5) CEMIL PAŞA Ekrem, Muhtasar Hayatrm, jînenîgariya nivîskar, bi tirkî, 104 rûpel. Çapa 1mîn 1989, a 2mîn 1991.
6) SOREKLî Şahînê Bekir, Jana Heft Salan, helbestên bi kurdî, 155 rûpel, 1990.
7) BIRO Taharê, Memê û Eyşê, şano (tyatro) bi kurdî, 162 rûpel, 1991.
- 345 -
8) ŞAKELI Ferhad, Kurdish Nationalism in Mam û Zîn of Ahmad-î Khanî, têzeke zanîngehî li ser destana Mem û Zîn, bi ingilîzî, 146 rûpel, 1992.
9) Kurdistan, broşureke dirêj bi foto, bi zimanê fransî, li ser rewşa Kurdan a gişti, bi hevkariya rêxistina beljîkî Solldarltê Socialiste û alîkariya maddî ya Kommisyona Ewropayê, 12 rûpel, 1993.
10) HASRA TYAN Manvêl A., Kurdên Tirkiyê di dema herî nuh da. Wergerandina rûsî-kurdî Tîmûrê Xelîl Muradov. 405 rûpel, 1994.
Weka ku xwendevanên me dizanin, ji berê, ango ji 1978 heta 1989, navê rêxistina me Têkoşer bû. Di wan salan de me kovareke çandî ya sêmehî bi zimanê kurdî, bi navê "Têkoşer" derdixist. Jê 43 hejmar derketine. Piştî ku me navê xwe guherand akir Enstitu, me ew kovar rawestand û di ciyê wê de bultena agahdariyê ya sêmehî derxist. Ji derveyî kovarê, me wê gavê gelek broşûr Û dosye, bi zimanên cihê, li ser Kurdan derdixistin. Em wan li vê derê nabêjin ji bo ku êdî zemanê wan buhuriye.
- 346 -
**

GERA BAŞÛRÊ KURDISTANÊ

Xeleka Yekemîn

Penaberên Binxetê li qampê Muqubil

Muqubl,wargehê penaberên başûrê rojavaye,li başûrê kurdistanê, di keve nêzîkî bajarê Sêmilê herema Dihokê,ev penaberên ku ji ber zilim û zora behsiyên sûrî reviyane başûrê kurdistanê,

nêzîka sed û şêst malîne,ev sê salin ku ew di bin çadiran de dijîn.

Ev sêsalin dibin gelek zor û cefayan de jiyana xwe derbas dikin ,lê tiştê ku wan li ser lingan dihêle kurdistana azade û ala azadiyê ye.
Zarokên binxetê hînî fedakariyê bûne û di dilê wan de kurdistaneke mezin heye û ji bo wê gelek cangorî dane ,li kur şoreş destpêbike ew di pêşenga şoreşê dene zarokên binxetê.
Hekûmeta herema Kurdistanê ji bo wan heştê û çar xanî avakirine û hîn jî ji awan re avadike,
gava em li wir bûn li ser roja bû ku herin xaniyên xwe yên nû,vê jî dilxweşiyeke mezin bi wanre çêdikir.
Muqubil sembola berxwedanvana 12 ê avdarêye,
li vir zarokên 12 ê avdarê mezin dibin û di êvarên kurdistanê de helbesta jiyanê dixwînin
û sirîda berxwedanê di qîrin.
Li ber tembûra bavê ronî govenda 12 ê avdarê û awaza hebûneke riç li ser perdeyên tembûra qamişlo digerînin.
Li ber dengê bavê ronî yê ku ji sînga qamislo şîrê rûmetê mêtiye,
ew dengê qerar yê ku êş û azarên Muqublê tîne ziman û govenda evîna binxetê digerîne,
li ber awazên koma qamişlo kulîkên başûrê dil dîlanê dikin.
Koma qamişlo ya ku ji xort û keçên 12 ê avadarê avabuye,dengê binxeta birîndara li başûr.
Şêrzad ev xortê ku di sînga amûdê de mezin buye û ji dibistana hunera amûdê şîr mêtiye,
tembûra 12 ê avdarê li muqubilê çêkir,bi tilîkên xwe yên zêrîn,tabloyên jiyanê diafirînê,
Şêrzad nîşana zîrekiya xortên binxetêye li kampa Muqublê.

Rûyarê Tirbespî,ev dilê ku helbest û awaza 12 ê avdarê afirand ,

pênûseke wêrek û helbesteke bi hest û evîneke mezin diyarî binxeta berxwedan û serhildanê dike.

Lawikê Hecî,binxeta birîndar bi helbest û pênûsa xwe melhem dike,di ser kaniya dilê wî de hunera pênûsa binxetê mezin dibe,pênûseke jîre li ser rûpelên binxetê.

Ahmed Sîno,dilekî mezin ji bo kurdistaneke mezin lêdixe,evîneke mezin ji rûbarên dirbêsiyê diherike zeviyên serhildanê.
Ahmed Sîno ev ciwanê ser sipî,ev dilê mezin,ev mêvanperwerê kurd,govenda tiliyan li ser derbuka binxetê digerîne,bi salan bi huneremendên navdar yên benxetê re buye hevalê awazên binxetê di rêtima kurdî de mamosteyekî jîre.

Ahmedê biçûk û 6 hevalên xwe berî demkê berê xwedabûn helbça birîndar û serdana gora nemir Mustafa Berzanî.
Bi vê meşê hiskirina ciwanên binxetê diyarî başûrê kurdistanê kirin
û ala hizkirin û fedekariya xortên 12 ê avdarê li başûrê Kurdistanê hildan.
Kurdên Muqublê tev kesên hêja û wêrikê binxeta birîndarin,yên ku zilm û zora behsiyan nebijrandin û serî neçemandin li hember neyarên azadiya xwe,îro ew dibin ala kurdistana azad de dijîn û ji dara azadiya kurdistanê tamdikin.
Bera li min biburînin ger min navê wen tevan nenivîsîbe,ew tev di dilê min de Ahmed û Rûyar û lawikê hecîne,li dîwana dilê xebatê ku wan tevan hizdike rûniştîne.
Min û hunermendê me yê deng xweş Zubêr Salih li kampa Muqublê şeveke hunerî ji bo xwîniyên binxetê çêkir,bi helbest û stranên xwe,me ew hinekî li kolanên binxeta birîndar gerandin.

Bi xwendina helbest û stranan,hêviya me bû ku,kenkî biçûk,diyarî zarokan 12 avdarê bikin,şahiyek biçûk jî be di dilê wan de rayêxin.
Bi hatina hunermenda navdar Gulbuhar moraleki mezin da me û zarokên kampa Muqublê, bêgoman hinek ji rayedarê heremê jî di ahenga muqublê de amedebûn.

Di dawiyê de ez hêvîdarim ji hemî hunermend,rewşenbîr û siyasetmedarên binxetê ku van lehengên 12 ê avdarê ji bîrnekin,
carcarna serdan
carcarna aheng û piştgiriya xwe ji wanre diyarbikin.
Bi gotineke xweş,
stranek xweş,
silavek xweş,
hûn dikarin dilên wan zarokên serhildanê şabikin,
serkeftinê ji xwîniyên kamba Muqublê re hêvîdikim.
Ger ber dewame……
Her şad û bextewar bimînin heya xeleka bê.
Xebat Şakir
01.11.2007 Elmanya Oldenburg
xebatchaker@hotmail.com
Gera Kurdistanê xeleka duwemîn
Gera li nav Êzîdiyên herma Şêxan li başûrê Kurdistanê
Roja duemîn ji gera me li başûrê kurdistanê,me berê xwe da lalişa nûranî, cihê ku bi hezarên salan li ser linga di xizmeta çand û hunera kurdî de zindî maye,
cihê ku rê û rismên êzdayetî û kurdayetiyê di dilê xwe de parastiye,
ew geliyê ku bi hezarên salan duha,qewil û lavijên kurdî di dilê xwe da parastiye,

ev cihê pîroz,yê ku her şev cirayên kurdî pêdxe û duhayê kurdî dixwîne.
Berî ku em derbasî geliyê lalişê bibin li ser destê rastê di navbera Şêxan û Lalişê de cihek heye jêre dibêjin neh darê,ew bi xwe niha sê darên şînin li keviya rê,dibêjin ew berê neh darbûn her şeş darên din hatine birîn kê birîne,çawa hatine birîn,çîroka wê ne zelale.
Di destpêka geliyê laliş de,li ser destê çepê,xaniyekî kevnar di navbera çem û rê de heye,
ji vî xanî re dibêjin Xanaêzî em ji terembêla xwe peya bûn û daketin jêr,
min pir dixwest ez derbasî nava Xanaêzî bibim û lê binerim ka çi di nava wê de heye,
lê mixabin derî û pencereyên wê bi keviran hatine girtin me nikarîbû hundirê Xanaêzî bibînin,lê ji dervê wê xweya dike,ku xaneke gelkî kevnare.
Em henekî din ber bi lalişê ve çûn hem sehwekê û hem jî kêfxweşiyekê ez girtim,ev cihê ku di dilê min de mabû hisret,ew xewna ku ez li ser dijiyam wê bibe rastî û cihê ku bav û bapîrên me ji bo wê serê xwedan û bi xwîna xwe parastin nêzîk dibe.
Cihê ku min tenê wêneyên wê dîtine,hêdî ezê wê bi çavên xwe bibînim û çavên xwe bi dîtina wê û guhê xwe ji duha û lavijên hezarên salan têrbikim û bi qurtekê ji ava kaniya sipî pê hinavê xwe hênik bikim.
Gava ez li ber piraselatê (pira eniz) daketim,hinekî ez ketim xeyalan û di ber çavên minre weke kurete filîmekî ferman û êrîşên li ser lalişê û berxwedanên gelê me yên ku laliş bi xwîna xwe parastine derbas bûn,
di guhê min de holhola bav û bapîrên me bilind dibû û digotin ev lalişe,ev xîrete werin hola û hola di cenga xîretê de hole.
Li raserî geliyê laliş gava meriv li jêra xwe dinere,tabloyeke hevgirtî ji rengan li ber çavên meriv çêdibe û xweşikî û delaliya wan quban romansiyetekê li ba merivan diafirîne,ew darên zeytûna yên ku ji duhnê

wan her êvar çirayên lalişê vêdikevin ew duhnê ku ji sedê salan hîn û hîn di hinavê lalişê de li dîwana şêxûbekir veşartî dimînin.
Li Lalişê odeya wêneyên şehîda bi sedan wêne hene wêneyên komkujya gir izêr û sîba şêx xidirî jî tê de dihatin dîtin.
Li hêleke din gora Mehmûd Êzîdî ku ew şehîdekî bi nav û denge li başûrê kurdistanê, Êzidiyên li wir pir qala destanên wî li hember rêcîma behsiyan dikin.
Deriyê Lalişê yê ku min di wêneyan de dîtibû,hêdî ezê bi cavên xwe bibînim,
dergehekî fereh û li ser destê rastê marekî reş heye û li hewşa wê dareke pir mezin û kevnar heye ew hewş camerekî ji bakurê kurdistanê bi xêra xwe kevir kirye,berî meriv bighê ber derî li ser destê çepê,dîwana bavê şêx heye,di wextê mersîmên olî de Bavêşêx li wir rûdinê.
Bavêşêx mirovekî xwedî bandore di nav êzîdiyan de,gotina wî pir tê guhdar kirin,cil û bergên wî tev kurdîne û ji rengê sipîne,piştî me gera xwe ya lalişê qedand,me rêya xwe bi Bavêşêx
xist û me hinekî li duha û dîtinên wî guhdarî kir,
ew li ser tifaq û tebaya kurdan û bi taybetî jî ya êzîdiyan axifî û her wiha gelek duha ji bo parastina vê olê û serkeftina miletê kurd kirin,
em dîse vegerin lalişê.
Di deriyikî teng û biçûre meriv derbasî mixarakê dibe pêwiste miriv xwe bitewînê heya ku meriv derbas be,
Di nava mixarê de cihukek diherike tenê sê mitra tu avê dibînî û piştire winda dibe,
jêre dibêjin ava zimzim,li ber derî li destê çepê kesên ku pişta wan dêşe pêwiste sê caran pişta xwe lêxin,dibêjin dermanê piştêye û êşa piştê radike,

di nava avê re divê tu pêxwas bimeşî û bi destên xwe avê bavêjî qerexê cuhikê û ji xwere duha bikî,li wir jêre dibêjin sela.
Berî ku meriv derbasî dîwana Şêxûbekir bibe pêwiste meriv gora şîxadî ziyaret bike û
li dora gora Şîxadî sê caran bigere,li ser gorê qumaşê atles heye rengê kurdîne û li wir kesên hêviyên wî/wê hebin dikare girêkekê li wî atlesî ji xwere girê bide.
Laliş
dîrokeke zindiye,
laliş
paratina rê û rismên kurdiye,
laliş
dilê kurdistane ava zimzim û kaniya sipiye,
mala Şîxadiye dikarî bixêr lalişa nuraniye.
Piştî gera me li lalişê û vexwarina ava kaniya sipî û xawrina li dîwana micêwrê lalişê û ziyareta xefurê rêya,me berê xwe da Dehoka Dasina ev bajarê ku sirûda azadiyê lê bilind dibe dinav cil û bergê kurdewariyê de mezin dibe,warê rewşenbîr û hunermendan,bajarê ku bilez û bez avadibe.
Em bûn mêvanê bingha laliş ya rewsenbirî ku ew bi fermî li gor zagonên kurdistanê kar û xizmetên rewsenbîrî di derbarê ola êzîdiyan de dike.
endamên wê tev kesên jîrekên êzîdiyane,xwendevanin,ekadimîne yên ku bi rastî dikarin bi zanistî kar û xizmetê ji bo vê ola kevnar bikin.
Em ji hêla birêz serokê bingeha laliş birêz Pîr Xidir Silêman û komîta rewsenbîrî ve,bi dil,germî hatin pêşwazî kirin,
di nava bingihê de moziyomeke jiyana êzîdiyan heye ku ji cil û berg û tabloyên jiyana êzîdiyan pêk tê.

Beşê erşîfê gelek dokomentên li ser rê û rismên êzîdiyan weke lêkolîn,wêne û vîdiyo dinav de hatine civandin,kovar rojname û pirtûkên li ser vê ola kevnar li wir peydedibin.
Misafirxana:ev cihê ku karê bidehan mêvana hembêz bike,cihekî ferehe mîna dilê komîta rewsenbîrî li hember mêvana.
Salona ku xebatên civakî lê tên li darxistin her roj bi dehan xort li dora bîlardo dicivin
geh li dora masê rûdinin û li ser pirsgirêkên jiyanê diaxifin û geh dikevin pêşbirka bîlardo,
hemî semîner û ahengên ku bingeh pê radibe mîna salvegera binghê semînerên ji bo mêvanan li wir çêdibin.
Pêwiste meriv wan fedekarê ku bi şev û rojê xizmetê dikin û nobedarên bingeha lalişin jibîrnekê,ew hem bi dilekî ferh û hem jî ,ji dil xizmetê dikin.
Li gundê xanikê berî ku ez herim bingha laliş ku li wir minê şeveke helbestê çêbikra min rêya xwe bi ziyareta mem şevan xist nêzî kîlometerekê ji xanikê dure ev ziyaret li ser girekî biçûk dimîne û di bin wê re gundê pîraye hem goristana û hem ziyaretegeheke pîroze,
li wir milet ji goristanre dibêjin (zehman).
Şaxên bingehê li herderê ku êzîdî lê dijîn hene lê yê min karîbû ez wan ziyaret bikim di vî wextê kin de ev bûn,
bingeha laliş ya Baedrê,
bingeha laliş ya Xetarê,
bingeha laliş ya Xanikê bûn,
li komelgehên Xanik û xetarê min şevên xwendina helbestê çêkirin min pir dixwest ku wextê min hîn dirêjtir bûye û min li herderê ku êzîdî lê dijin şevên helbestê cêbikra,
lê gotineke pêşyan li wir hat bîra min ya ku dibêje ger tu dizbî şevreş zehvin ez hêvîdarim ku kurdistana me parastî bimîne heta hetayê ji bo

her kurdek çavên xwe bi dîtina wê kil bike û dilê xwe bi hebûnê wê germ bike û di guhê her kesî de sirûda azadiyê bilind bibe û ev tifaq û tebayî ya gelê me ebdî bimîne.

Ger berdewame……..Heya xeleka bê Şad û bextewar bimînin

Xebat Şakir

07.11.2007 Oldenburg / Elmanya

xebatchaker@hotmail.com

Gera Başûrê Kurdistanê xeleka sêyemîn

Çiyayê Gara û Qendîl

Di nav xewin û xeyalên dîtina kurdistana azad de, me 15 ê meha dehan katijmêr 24:00 ji balefirgeha frankfortê me berê xwe da warê hêviyan,welatê ku melyonên şehîdan canê xwe fedayî xaka wê kirine,welatê 184000 anfaliyan,welatê ku bi hembêzkirina lalişê şadibe, welatê ku dibin bihazaran êrîş û jênosîdan re derbasbuye û vaye îro nû çavên xwe li jiyanê vedike,welatê ku dibin xerdelê de birîştî ma.

Welatê şêr û egîtan,welatê ku mirovatiyê lê çavê xwe vekiye û dîroka ku di şekefta şanederê de hîn li ser lingaye.

Em li nîvê dilê kurdistanê peyabûn li hewlêra payîtext,paytexta hêviyan,ya ku lê ala rengîn li ba dibe,ya ku kurdî lê şîndibe,hewlêra dibin gefên kemaliyan de yên ku bêhna buhara wêkirine û di rûxandina bircên wê de birikin,wan kemalistên ku nehiştin kurd di ser ezmanê wê re jî bifirin,ewên ku mîna gayê spanya ku ji paçikên sor acizin,ew bikîna wan ga ji rengên kurdî acizin û li herderê êrîşî kurd û kurdîtiyê dikin.

Me ji Hewlêrê berê xwe da warê mîrê kor,koy inceq,mîrê kor yê ku bi êrîşeke kor hat ser çiyayê şingalê,yê ku bû şûrê îslamê li dijî kirasê sipî,em li jora koyî sinceq rawestiyan û min lê nerî û holhola bav û bapîrên me di guhê min de bilind dibû,di dilê min de qîrînek mezin bilin dibû û diqîriya û digot rabe ser xwe û me bibibîne mîro,em neviyên destanên çiyayê

şingalê ne û bermayên fermanane û va kurdistan azade tu nemakarê bi min mîro,bi dengekî nazik vî bajarê xweşik û delal digote min mafê te heye tu hêrs bibî cilsipiyo,lê ji bîrneke ku min jiyan jî li vî gundî afrinad,netenê zilm û zor ji min rijya,her wiha min egîtek da kurdistan ku ala kurdistanê li badike navê wî mam celale û ewe yê ku dibin gefan de li bexdayê xîreta kurd diparêze,min ew bo we kir diyarî,mam Celalê mezin,mam Celalê tekoşer,van gotina hinekî dilê min rihet kir û şabûna azadiyê di dilê min de gur û mezintir kir.

Me rêya Sîngeserê şopand û berê xwe da hêlîna kurdan ya hezarê salan,dayika ku kurd hembêzkirin û tucara zarokên xwe nedan dest neyar û bêbextan,

ew dayika şervanaye,

dayika lehengaye

dayika Berzaniyê nemire,

ya qadiyê mezine,

ya şêx sehîdê rûsipiye,

ya pîrê mezin Sehîd Rizaye,

ew cihê ku mihemd şêxo li ser dinaliya,çiyayên kurdistanê ciyayê hêviyan çiyayê berxwedanê,çiyayê Qendilê,

hêlîna mêrxas û Egîtan,

hêlan buk û zeriyan,

hêlîna bêrîvan û bêrîtanan,

ew çiyayên ku li ser dilê neyaran buye kabûs.

Bi dîtina baz horiyên çiyan,dilê min mîna pirpirîka buharê firiya ber bi wan ve û dilkutên dil beziyan û ez di nava xeyalan de hatim hûnan û di nav pirsan de hatim pêçan,

çiyawo te çend bêrîvan û te çend Sebrî hembêz kirin?

te çend cara nemir Berzanî di sînga xwe de parast?

û çend hov hatin û çû û ti mayî qendîla kurdan?
tu mayî dayika bêrîtan?.
Ev zarokên tene û hêviyên mene,wan bi dibin mijulkên çavên xwe de biparêze,ji bo kenê terqiyayî ji ser lêvên zarokên amedê vegerînin,ji bo lîstkên zarokên dêrsimê ji bin potînan hovan derxînin,û dayikên mêrdînê di govendên zavan de bi lîlînin û xort û keçên botanê li ber gora şahê evînê rûnin û ji memê alan û zînêre çîroka evîna xwe bixwînin,wan biparêze çiyayên bilind.
Ew hêviyên mene,ew zarokên mene,ew hebûna mene,ew bira û xuşkên meine,wan biparêze.
Bi ken û silava keça efrînê re,ez hişyar bûm ji xewnên xwe,piştî silaveke gerim ji destekî nerim ez çûm civata zave û bûkên kurdistanê,bi hinek helbest û hinek stran di şahiya azadiyê de,em bi xwîneke gerim li çiya û baniyên qendîlê geriyan.
Ji wir me berê xwe da çiyê Gara ew çiyayên bi dar û ber û rûbar,
ew çiyayê ku di hembêza xwe de zarokên Qamişlo,Dêrik,serêkaniyê,tirbespiyê kuban û efrînê mezin dike,
ew bazên ku ji bo azadiya me bi stêrikanre şiyar dimînin û bi dar û beran re dikenin,
di nav lat û zinaran de digerin lê qet nawestin,
ewin yên ku ala azadiyê hildidin û turikê hêviyan hildigrin,li benda helbesteke xweş û straneke xweş li ser zinarên mezin dimînin,
ewin yên ku di dilên xwe de zarokên binxetê mezin dikin û li şîretên rêberan guhdar dikin,
ewin yên bo me bûn hêvî ,bo me bûn ronî,bo me bûn şahî, şervanên azadiyêne destanên zindî.
Ez çiqasî bêjim hindike li ber bejina zarokên binxetê û pênûsa min nikarê pesinê wan bidê,

ew tîrêjin,li dêmên welatê rojê,kehnîne ji bo vê xakê û rêwîne,rêwiyên azadiyê,
rojek wê bê ku ew ji sînga çiyan ber bi me ve werin û em bi hevre dîlana azadiyê bigerînin û gulan bi destên zarokên berxwedanê diyarî wan bikin,
hûn zarokên binxetêne,
hêviya bavê cûdîne,
rêhevalên fuad û şîlanêne,
hûn zarokên rojêne zarokên binxetê.
Ger berdewame…
Heta xelekeke din şad û bextewar bimînin
Xebat Şakir
08.11.2007 Oldenburg / Elmanya
xebatchaker@hotmail.com
Gera kurdistanê xeleka çaremîn
Herema Berzan
Me ji Dehoka dasina katjimêr 7 ê sibihê berê xwe da hêlîna Berzaniyê nemir,yê ku dara azadiyê çand û bi kaniya dilê xwe avada,ji bo azdiyeke bi şan û rûmet,bi salan di hembêza çiyan de ma.
Me berê xwe da xwezaya ku tu kes û tu pênûs nikare xweşkaya wê li gora bejna wê bîne ziman û binvîse,wan çiyayên ku bûn hêlana bi hazara pêşmergên qehreman,cihê ku şikefta
şanederê lê dimîne,ew şikefta ku mirovatiyê çavên xwe lê vekirye,
cihê ku zêremoka zerdeştiyan hîn li ser lingaye.
Me berê xwe da çiyayên ku bûn şahidê berxwedana her çar lehengên ku xwe kirin qurban ji bo dara azadiyê şîn bimîne û agirê şoreşê gur bimîne,yên ku berxwedan kirin ji bo em bijîn,
şer kirin ji bo şemala azadiyê pêketî bimîne,

canê xwe kirin dîwar li hember neyarên azadiya me û ji bo şoreş û rêberê şoreşê zindî bimînin, kolikên xwe bernedan li hember dahakên bexda,
li ser wê berxwedanê em niha ala azadiyê li ba dikin û gulên azadiyê diyarî hev dikin.
Berê me li dîtina wî miletê fedekare,yê ku nîvê bêhtir ji ber zilim û zora neyarên mirovatiyê ne li berzan hatine dinê,lê berzan di dil û ojdanê xwe de mezin kirine,ji wan bûn,heşt hezarê di sibeheke hov de bûn qurbana xaka pîroz bi destên dahakê bexda ,
ewin yên ku dibin enfalan re derbas bûn,lê man girêdayê xaka xwe.
Me berê xwe da cihê ku jê rubarê mezin û û rubarê biçûk diherke,
ew rûbarê ku bi sedê cara rengê xwe bi xwîna Berzaniyan guhert,
ew rûbarê ku bû şahidê gelek komkujiya û bû şahidê gelek destan û qehremaniya,
ew rûbarê ku hîn jî di ojdanê berzaniyan de di herike,
ewe yê ku di sînga geliyê berzan de sînfoniya jiyanê diafirîne.
Me berê xwe da dîtina latên bilind û zinarên asê,
yên ku bûn şahidê xwe kuştina gelek jinên berzaniyan ji bo namûs parastî bimîne,
ji bo destên hovan neghe hibiriya kurdî,
ji bo di çavên zarokên xwe de horî bimînin,bi kêfxweşî berê xwe dan mirinê,
ew jinên ku reseniya kurdan li ser zimanê zarokên pêşrojê parastin.
Me berê xwe da hêlîna dayika berzan,
ya ku kak Meshûd diyarê şoreşê kir û di dibistana şoreşa Mustafayê nemir de mezin kir,
ya ku bi şîrê rûmetê zaroka xwe mezin kir û di sînga çiyan de hêlîn çêkir.
Ew dayike,
ya ku îro kurdistan emanetî serokekî xewdî beryar,jîr û wêrek kir,

serokê kurd yê bi helwestên netewî hêlîna xwe di dilê her kurdî de çêkir,
ewe yê ku ji beryarên şifqeyê mirinê re got na û biratiya kurd mezin kir.

Milete ku îro tama azadiyê dizane û bi mijûlkên çavan kurdistanê diparêzin,
ew zarokin yên tim şiyar dimînin ji bo ala azadiyê bilind bimîne,
ewin yên parêzvanê namusa kurd dimînin,ji bo careke din hov venegerin.

Me berê xwe da gora Berzanî yê nemir,û me got.
Ji dûr hatin ji bo em te bibînin
Silav bidin û ayetekê li ser te bixwînin
Li ber gora te helbestekê bo te bixwînin
Tu şehîdê gelî te pir mezin dibînin.
Em hatin û di destê me de baqek gul heye
camêrî û rûmet her û her behra teye
bexçakî gula te çêkir û serkanî dilê teye.
Kurdistan azade nemir pîroz be ev keda teye.

Me berê xwe dab a rêberê xwediyê destanên mezin,
rêberê binav û deng,bejina bi şal û şapik,
rêberê ku dilê xwe ji çil melyon kurdan re vekir,
rêberê ku azadiya kurdistanê di dilê wî de ma û çavên xwe ji dîtina wê têr nekir,
ba yê ku li buheştê li dîwana şehîdan rûniştiye.

Micêwrê gora seydayê nemir,
Seydayê Abdulah ye ku ji bo bi xêrhatina mêvanan tim li ser lingaye
kalê bi şal û şapik,

yê ku bi helbestên melayê cizîrî mezin buye,
yê ku bi hestên helbestê dijî,
yê ku gulên kurdistanê li dîwana helbestê radixe,
yê ku jîrekiya şatrencê bi hestên helbestê dihûne.
Ew seydayê dev li ken,mêvan perwer û dil fereh,
ewe yê li dîwana nemir Mustafa Berzanî bi xêrhatina mêvanên wî dike,
min pir ji vî kalê dil ciwan hizkir û min pir dixwest ku ez bi rojan li dîwana wî rûnim û li şêraniya suhbeta wî guhdar bikim,
lê mixabin zemanê me yê kin nehişt ku em ji civata vî camêrî têr bibin.

Çûna me ya herema berzan di destpêkê de,
em ji hêla Serok û xebatkarên radiyo ya Herman birêz Faxir Alî(berpirsê radyoyê) û Helbestvan Semîr berzanî ve hatin pêşwazî kirin,
radioya Herman li gundê Bilê ye,bi rastî jî,em dibin marîfet û misafirperweriya van camêran de man,bera li min biburînin ez tu hevokan nabînim ku dilgermî,merdî û rûgeşiyan van camêran ji bo me bînê ziman,bi maresîm û xêrhatineke gerim,em ji hêla hemî xebatkarên radiyo ve hatin pêşwazî kirin,ev jî rastiya kurdperweriya xelkên devera berzan diyar dike.
Di destpêkê de em û hemî xebatkarên radiyo yê çûn xwaringeheke ku li ber rûbarê bû,xwarineke xweş û xizmeteke baş diyarkirin.
li ber wê xwaringehê pireke kevin hebû û dinav avê de hesinekî kevin û rizî ji bermayên pira kevin di nav avê de xweya dikir,
ez bawerdikim ku ev hesinê dinav rûbarê avê de zingar girtî,ji bermayê êrîşeke li ser wê pirêye.
Ji xwe tu deverê vê heremê nemane ku êrîş li ser nehatine kirin û dibin her kevirekî ji kevirên wan çiyan de, hestiyên kurdan wê werin dîtin û her bostek ji axa vê heremê xwîna zelal vexwariya.

Piştî xwarinê em vegeriyan radiyo û di bernama dîdar de bûn mêvan,
radiyo em li malên berzaniyan kirin mêvan,
me dengê xwe û sipasiyên xwe gihandin hemî devera Berzan,
êvarî jî hunermend Zubêr Salih di bernameyeke hunerî yên radiyo de bû mêvan û dengê binxet û kurdewariya binxetê gihand xelkên deverê.
Di wextê ku kak Zubêr di bernameyeke zindî de bû,ez bi arîkariya helbestvanekî
Hazim Muhemed Bilî û nivîskarê kurd Bubê Eser çûm serdana cihê zerdeştiyan,
yê bi navê zêremok ew nêzîkî gundê Bilê ye, xebatkarên radiyoyê bi vî navê dîrokî kovarekê derdixin,
Zêremok cihekî dîrokiye li ser girekî biçûk dimîne,gava ku roj derdikeve û heya herê ava roj dide gir,ji cuhikên di latê de dihat xweya dike,ku ev der berê koristanê zerdeştiyan bû, û li gor zaniyaran pêwiste gundê zerdeştiyan jî li dora gir,yan jî li ser girê li kêleka rê hebe.
Kak bubê Eser ew nivîskarkî kurdên bakurê kurdistanaye,li kurdistana azad dimîne ji bo nivîsandina romanekê,xwedê jê razî hekumeta herema kurdistanê hemî derfetên xwe li ber kak Bubê Eser vekirine ji bo serkeftina vî karê pîroz,her wiha ji hêla xebatkarên radiyo ya herman ve jî arîkarya wî tê kirin.
Berî em bighin herema Berzan,
em di bajarê amediyê re derbas bûn,
amadiya ku li serê girekî bilind,dîrokeke zindiye,

li kêleka rêya amediyê sulafên avê rewşeke tayîbet didin vî bajarê kevnar û deriyê keliha
amediyê yê ku dibe tabloyeke xewşike ji bo amediyê,

miriv di nav hestên nazik û tenik de dihûne,

Goristanê Amediyê dikeve pişta bajêr.di kêleka rê de,di vî goristanî de hunermendê nemir Tehsîn Taha lê bicî bûye.

Ma çawa emê di ber vî mirovê xwedî keda mezin,xwediyê dengê xweş re derbas bin,bêyî ku em silavekê,ayetekê û ramusanekê nedin dêmên kêla bin serê wî.

Ev hunermendê ku bi salan xizmeteke zanistî ji bo çand û hunera kurdî kiriye.

Nemir Tehsîn Taha di sala 1941 ê de, li başûrê kurdistanê hatiye dinê û di 04.06.1995 an de,
li Holenda koça xwe ya dawî kir,wî zanîbû ku tenê cendekê wî di karê li xaka kurdistana azad rihet bibe.û niha jî li kurdistana azad li bajarê dîrokî Amediyê gora buheştî dimîne.

Goristana enfalê,ya ku bi hezaran kal û zarok,jin û bûk ,xort û zaveyên kurdistanê lê bi cîbûne
Di berbangeke hov de
184 hezar gul bi destên hovan qurmiçîn.
û di bêdengiyê de
184 hezar dil perçebûn.
Behsiyên hov
di dilê kurdistanê de
184 hezar hêvî kuştin.

Ew cihê ku jenûsîdê û hovîtiya dahakê bexdayê tîne bîra mirov,
cihê ku hêstirên dayikan tevlî rûbaran dibe,
cihê ku hîn li benda bi hezaran cendekên windaye.
ev kuştina mirovatiyê ye
ev mirina wek heviyê ye
ev jenosîda kurdayetiyê ye
ev enfala ji pirtûka hovaye
184 hezar gorên winda ne
Ev enfala,enfala kurdistane.

Me li goristana enfalê xwişkek kezeb şewitî dît, li ber gora xizmê xwe digriya,di riwê re xweya dikir di hinavê wê de kezeba wê perçe dibû û digot di sibeheke hov de bira û xwişkên me ji mal birin û ji hingî ve çûn û vengeriyan,
hîn li ber çavê mine kenê wan,
bêrî bûna riwê zarokan xweya dike.
û digot û digot û digot bi çavekî tijî hêstir û gewriyeke kelogirî.
tê bi ser kê de bigrî
kure û keçe,
bave û biraye,
dil û kezebe
buk û zavaye
hima bi ser min û xwe û wan de
bigrî û bigrî û bigrî
Ger berdewame
Xebat Şakir
11.11.2007 Hanover /Elmanya

xebatchaker@hotmail.com

Gera kurdistanê xeleka pêncemîn

(Kampa Mexmûr)

Penaberên ku di bin ala neteweyên yekbûyî de li ser xaka kurdistana azad dimînin,bi hêviya vegera gundên xwe.

ew gundên ku dibin potînên leşkerên tirkan de dimînin,

ew gundên ku bi hezarên sala bav û bapîrên wan ew di hêlana evînê de hejandin,

ew gundên ku ew bi dîlan,çîrok û stranên kurdî mezin kirine,

niha çavên wan zoq sekinî li benda vegerêye.

Penaberên ku li kurdistana azad dimînin,ew kurdistana ku îro di nav gefên melayên tehranê û şifqeyên mirinê yên Anqera û bablîsokên kîna Egalê de li ber xwe dide.

ew kurdistana ku ji bilî kurdan her kes li benda xwendina mirina wêne,

ew kurdistana ku egal û şifqe û şaşik ew bi agirê kînê dorpêçkirine.

Kurdistana ku bo wê bi sedhezaran can bûn diyarî,

Kurdistana ku Mehmûdê êzîdî di dilê xwe de mezin kir û bi xwîna xwe ya zelal avda,

Kurdistana ku ala Mihabadê hildide,

Kurdistana ku mele Mustefa dara azadiya wê bi hestên xwe avda,

Kurdistana ku îro sînga xwe ji pazdeh hezar kurdre vekiriye û li ber gefên kemalistan li ber xwe dide.

Penaberên ku heya niha 7 cih guhertine li ser xaka xwe,

penaberên ku bûn armancên êrîşên dijminê hebûna kurda,ji hêlekê ve û ji hêla din ve mar û dûpişkên bê ewle.

Penaberên ku ji berxwedanê newestin,

penaberên ku ji kaniya xîretê avê vedxun û ala rengîn li şehîdên xwe dipêçin,
ewin yên ku tucara şerê birayê xwe nekirin û ji bo azadiya serokê xwe diqîrin,
ewin yên bi keda xwe dibistanên kurdî avakirin,
ewin yên navê Xeyrî û Mezlûm li zarokên xwe kirin û
di dibistana şoreşê de mezin kirin.

Gelo mêvaniya yek şevê wê çiqas karibe mêvanperwerî û dilgermiya wan,êş û derd û azarên wan,keft û left û berxwedana wan bîne?.
Emê ji zarokên pêşrojê destpêbikin,
ew zarokên ku îro di dibistana berxwedanê de mezin dibin,
yên ku di dibistana kurdiya şêrîn de mezin dibin,
zarokên ku di çavên wan de azadiya kurdistanê dixwîne û belengazî diqîre,
ew zarokên dibistana amedeyîne û li mexmurê dixwînin,
li ber destên mamostên ku tenê ji bo kurdiya şêrîn dijîn,
mamosteyên ku bi rikin di pêşketina sîstema perwerdeya zarokên mexmurê de,
ewên ku ji ber destên wan bi sedan zarokên mexmurê di zankoyan de mezin dibin.

Weqfa Jinê:
Dayikên fedekar,dayikên berxwedanê ,
yên ku dibin gelek zor û zehmetiyan de zarokên xwe mezin dikin û kurdî ya şêrîn diyarî wan dikin û wan bi bi stran û lorîkan,bi çîrok û destanan û bi sema û govendên kurdî mezin dikin.
Dayikên ku di wextê xwe yê vala de,

li weqfa jinê xwedî derdikevin,li weqfa ku gelek karên ku bi destê jina kurd berê dihatin çêkirin,niha li wir çêdikin,

Bexçeyê zarokan:
Me çend stran û helbest li ber ken û lîstkên zarokên xwînî gotin,
armanca me konsêrteka mezin bû,lê rêveberiya kampê beryarek dabû ku di meha dehan de
tu şahî li kampê nêyên çêkirin,
ji ber vê me nikarîbû ku em konsêrtê li kampê çêkin,lê ji bo zarok û xebatkarên saziya jinanan me çend stran û helbest ji hestên xwe diyarî berxwedana wan kirin,diyarî kenê wan kirin.
Saziya şehîdan:
ya ku wêneyên bi sedan şehîdên serxwebûn û azadiya kurdistan bi dîwarên odeyên wê ve hatine dalqandin,navserekî ku du zarokên xwe kirine xelat ji bo kurdistanê,bi mere li odeya wêneyan digeriya,
me hinekî di ber dîmenên wan lehengên kurdistanê re li apê xwe guhdar dikir,li dilsoziya wî bi şehîdên kurdistanê re,
di wî wextê ku me li wêneyên şehîdan dinerî û li apê xwe guhdar dikir ,eletrîk hatbirîn,em mecbûr bûn ku gera xwe nîvco bihêlin û ber bi bexçê serok ve herin û li wan darên gula ku her sal di rojbûna serok de tên çandin binerin,ew bexçe bi destên zarokên mexmurê bi gula hatiya xemlandin.

Şaziya çand û hunerê:
saziya ku bi dehan ciwanên mexmurê di dilê xwe de hembêz dike,
saziya ku dîlan,şano û mûzîka kurdî bi destên ciwanan pêş dixe,
me berê xwe da ser

Dikê û me li cihên temaşevanan nerî,
yê ku ji bo konsert û şevên hunerî bi kevaran hatiye çêkirin,
mîna tabloykê ji kevirên mexmurê xemilîye,
li ser wê dikê em sekinîn hestekî bilind yê xwendina helbestê li ba min afrand,
ez dinava xeyalên konsêrteke mezin de hûnam,
di wî wextê ku tirkan gef li başûr û qendîlê di xwendin,
di wî wextê ku hevala dicle û hevalê zubêr diaxifîn bi hestekî bilind min berê xwe da dîwana temaşevanan û min bi dengekî bilind lê bêyî ku tu kes dengê min bibhîze min ev helbesta bi navê qendîla kurdan xwend.

Dîse gurên vemirandina qendîla welatê rojê
li ser sînga xaka sor dizûrin,
û di xewnerojakan de
darbesta qendîlê hildidin
ser milên şivqeyên mirinê,

ji bo cîhaneke
bê kum û kolos
bê şal û şapik
bê tok û xirqe
bê kofî û xeftan
li her derê gurên bi şivqe dizûrin.

Potînên hov û şaşikên mirinê
li ber bircên başûrê dil
gefên terqîn û yasîna
li ser mirina welatê rojê dixwînin,

lê li ber pirtûka çiyan têkdiçin,
û li hember destanan windadikin
qendîla başûr wê bimîne pencera ronahiyê
ji bo hersê hêlên dil.

Bi hezaran,
qendîl vêdikevin
sirûd bilinddibin
şal û şapik dibin xelekên ji agir
li dor başûrê dil,
û xecxecokên ku bi xwînê vebûne
li çiyayên bilind,
dibêjin;
hun karin me bikujin
lê hûn nikarin bi serkevin,
li hember berxwedana mezin,
ji ber li ser yek rêtimî
îro çil melyon dil dijenin.

Bi dengê hevala hevala dicle re helbesta min bi dawî bû û em ji ser dikê berê xwe da meydana sportê, li wir xort bi topê dilîsti.
Piştir me berê xwe da avahiya belediyê,
ya ku nû dihat avakirin ji bo xizmeta bajarokê mexmurê.

Mêvaniya me li mexmurê mîna xewnekê bû,ne me karîbû baş bigerin û ne jî zêde kesî bibînin,
êvarî li musafirxanê dayikeke navser rûniştî bû,meriv tucara ji axaftinên wê têr nedbû,

wê dayikê bi axaftinê xwe dayika min anî bîra min,bi henekên xwe,bi cidiyeta xwe û bi hestên xwe yên pir bilind,ez dinava xeyalên dîtina dayika xwe de çûm rojavayê kurdistanê gundê girxatunê û li wir di hembêza dayika xwe de rûniştim.

Wextê xewê em çûn malekê û li wir hinek dost û heval li me civiyan bi hinek helbest û stran me şevbuhêrka xwe derbas kir.
Roja din Katjimêr 10 ê sibhê me berê xwe da bajarê Hewlêrê,
Hewlêra ku li benda meye ku berê me bidê xerîbiyê.
Êvarî li hewlêrê me berê xweda keliha hewlêrê,

ew keliha ku di nîvê bajarê hewlêrê de mîna şemaleke pêketî dimîne rewşeke taybet didê paytexta hêviyan,

li ber dergehê kelihê helbestek hat bîra min ji bo hewlêrê ev helbest xwend.

Paytexta gel tuyî stêrka bilind
hibira li ser avesta,zend
nemir berzanî li ser te xwend
can Hewlêr paytexta gelê min.

Stêrika li ezmanê bilind
pêşmerge ji bo ronî û find
ji bo kurda tê bibe navend
can Hewlêr paytexta gelê min.

Di dilê me de mabû hisret

ti bû awaz û strana binxet
ji bo kurda tu mal û serwet
can Hewlêr paytexta gelê min.

Tu evîna Xec û Siyamend
sirûda azadiyê te xwend
ji bo Kurda tu bû mom û find
can Hewlêr paytexta gelê min.

Piştî gera keliha hewlêrê me berê xwe da utêlê ba bavê ronî û çend xwendevanên rojavayê kurdistanê,nêzîkî du seatan me helbest û stran ji wanre gotin û piştir me berê xwe da ba karkerên kurdên rojava û bi wanre me şeva xwe heya dawiyê bi helbest û stran berdewam kir û ji wir me berê xwe da balefiorgeha hewlêrê,

du heftiyê gera me,di dilê me de cihekî xwe yê taybetî çêkir û kurdistana azad li dîwana dil paldayî ma.

Heta careke din,
hevdîtineke din,
hewlêra min,kurdistana azad tu bimînê dinav azadî û aramiyê de,
dinav xebat û pêşketinê de,
tu her bimînê li ber şemalên azadiyê,
tu bimînê payîtexta dilê xebat,xebatê vku ji te hizkir û wê hizkiryê te bimîne.
heta hevdîtineke din,
Dehoka dasina,
Şêxana mîrekan,
Zaxoka evînê.

Heya careke din bi hêviya ramûsanekê ji dêmên Silêmanî,Kerkûk,û Şingala birîndar,

hûnê di dilê xebat de her bimînin şemal.
Spasiyeke gerim ji bo Xebatkarên bingeha Laliş ya dehokê û tayên wê.
Sipasiyeke gerim ji bo dostê hunermenda seydayê Tehsîn kemeklî.
Sipasiyeke gerim ji bo nivîskarê me yê giran buha Hesen Silîvanî.
Û spasiyeke gerim ji bo Ahmed sîno û hemi kesên ku li kampa muqublê dimînin.
Spasiyeke gerim ji bo dostê hêja Dr.Xeyrî helbestvanê hest tenik.
Spasiyeke gerim ji bo xebatkarên radyoya dohkê.
Spasiyeke gerim ji bo xebatkarên radio ya Herman ya herema berzan.
Spasiyeke gerim ji bo hemi heval dostên ku arîkarya me kirin di gera kurdsiata azad.
û spasiyeke gerim ji dilekî gerim ji qendîla kurdare û ji wan buk û zaveyên kurdistanê yên ku ji bo azadiya me tekoşînê didin.
Û spasiyeke gerim ji zarokê binxetê re yên ku hêlîna xwe di sînga gara de çêkirine.
Dibe min nave hinek heval û dostan jibîr kiribe bere li min biburînin.
Dawiya gera me li Kurdistanê.
Xebat Şakir
13.11.2007 Oldenburg /Elmanya
xebatchaker@hotmail.com
**

KURD

Runkirin û Ditin
Kurd Neviyen Midiyan
V. F. Minoriski
Diyariya Daner
Ji bona Pireka min û Hevriya Reya min
vi bere peşiyi guna me di sala 1914 de didim
bipeşkeşkirin.

NAVROK

Pegotina Kurmanci 1
Deriye Peşi 9
Li Rusya de 12
Li Faris de 13
Li Turkiye de 14
Deriye Duwem
Mejuwa Kurd 17
Deriye Siyem
Jiyana Rojane -Desteyen divaki- Kesitiya Kurdan 31
Deriye darem
Ziman - Weje - Nivisandin 35
Deriye Pencem
Oldari 46
Deriye şeşem
Sinciya Kurd 58
Deriye Heftem
Rewşa Pireke -Pewendi ligel Mileten din de- Pirsiyariya Kurd 73
Deriye Heştem
Kurd li Rusya de 83
Pegotina Dr. Kemal Mezher ya Erebi 87
Kurd Neviyen Midya 89
Kar û baren Daner di ware Xwendekariyen Kurdi de 98

Pegotina Kurmanci

Xwendevanen heja! Vaye ez ji bona nava desten we ve Nivista Minoriski Beşe yekem: Kurd, Runkirin û Ditin û Beşe duwem: Kurd Neviyen Midiyan bi dilxweşi û bextiyari ve didim bidanin.

Beşe yekem ew ji bal Dr. Maruf Xeznedar û Beşe duwem ew ji bal Dr. Kemal Mezher ji Rusi ji bona Zimane Erebi hatiye biwergerandin. Min ev wergerandina Kurdi li ser wergerandina Erebi daye bikirin.

Ez di xwazim li ve dere de bi dil û can ve sipasi van herdu Mirovan li ser ve kirina kare haneyi bi nerx û pir giranbuha ve bidim bikirin.

Herwehaji ve care ji nala hercar ji bi nefari ve ez ji Xwendevan û Rexnevanan heviya lebuhurandine li ser hemu kur û kemaniyen ve wergerandina hane de ji bona zimane me didim bidaxwazkirin.
Min ev Wergerandina hane ji bona Zimane meyi De date biwergerandin, da ku Zimane meyi xweş û perest pe bete bipeşvexistin û Gele Kurd li ser rupelen mejuwa xwe de betir pe bete biagehdarikirin û bişiyarkirin.
Gava ku Merov ve Nivista hane bi herdu beşen we ve ji xwe re dide bixwendin, weha rupeleki tariyi veşarti bi Sedan sal ve li ser gundwa kurdiyi poşandi de jiber faven Merov tete dutakirin û bitarumarkirin; jiber ku ev kare hane ji bal yekeki ji gewretirin û karnastirin Rojhilatnasen gundvanen ve Serdema me hatiye bitomarkirin. Wi nebes tene rupelen poşandi li ser gundwa me de dayite bihilanin, lebeleji bersiven pir bi nerx, heja ve û bejimar hejibetir li ser bingehe zanistiye de li ser pir pirsen be bersiv de di mejuwa me de û herwehaji di ve deme me ji de dayite bidan. Ev kare haneyi bifuk bi saya Minoriski ve kereke xweyi pir zanistiyi mezin di du xwe de dayite bihiştin. Ev li ser tevaya me Kurdan
Tewfiq Wehbi û hie kesekitir li ser nebu we, etir we hisabkirawe ke Miriski nusitewe.
Le helkewtik de kore zanyariyi Kur le Begda em base dest kewt we goryanewe bi ser zimane Erebi we bilawyankirdutew. Le deway belawkirdinewe mustefa Neriman witareki le rojnemey ‚Jlawkari“ Begdad de belawkirdewe û em rastiye peşya da, ke baseke he Tewfiq Wehbiye û he Minoriski niye, le witareke de Mustefa Neriman ewey peşan dawe ke le katek de le Lenden bowe û em rastiye le Tewfiq Wehbi xoyi bihistuwe.
Min bo ewye em rasti derxist 9unke meju wedibe rasti be“
Dr. Maruf Xezendar
Navnivisandina wina
Berlin, 31. 8. 1998“
dide bipewistkirin, ku em pir bi huri, wirdi û kuri ve vi kare hane ji xwe re bidin bixwendin û biliberketin; jiber je em dikarin pir di mejuwa xwe de û hejibetir di xebata xwe de ji bona Serxwebuna xwe betin biliberketin.

Xebata me ji bona Rizgarkirina Welate me û Azadikirina Milete me nayete biserketin, ger ku em bi başi û bi rek û peki ve li ber tevaya mejuwa xwe de neyetin bikevtin. Mileteki be meju mina Menaleki be serpehati tete biditin.
Biserketina xebata me li ser me dide binefarkirin, ku em şev û roje dive di tevaya gundwa xwe de û herwehaji di tevaya mejuwa dorhela xwe de betin biliberkevtin. Dive em xwe bi xwe bidin binaskirin, ger ku em ji ji xwe re bixwazin, ku bele em ji nala Mileteki Azad di nava kurdistana xwe de bi serbesti, serfirazi, bi xweşi û bextiyari ve betin bijiyandin.
Tevaya Bedbextiya me, perfekirina Kurdistana me, talankirina dewlemendiya Welate me û bi serdeji hejibetir kole û bendekirina Milete me bi careke ve di Nezaniya me de tete biditin. Ev rastiya tirş û tal li ser Zanevanen Kurd de dide bipewist û binefarkirin, ku ew şev û roje ji bona peşvexistina Zimane me û şiyarkirina Milete me bidin bikeftileft û bixebatkirin.
darekirina Pirsiyariya Kurd di Rojhilata Navin de li ser berjewendiya Gele Kurdistane de bi dare fo ve de bete bifarekirin.
27. Kurd. Kurdistan, Berge Duwem, dapa Firensi, R.1196- 1222, dapa Ingilizi, R. 1130¬1155, dapa Elemani, R. 1212- 1240.
28. Lek, Berge Siyem, dapa Firensi, R. 11-12, dapa Ingilizi, R. 10-11, dapa Elemani, R. 11-12.
29. Lor, Lore Mezin û Lore Biquk, dapa Firensi, R. 43-51, dapa Ingilizi, R. 41-50, dapa Elemani, R. 45-54.
**

KURD NEVÎYÊN MÎDÎYAN

Kurd

Rûnkirin û Dîtin

V. F. Mînoriskî

Diyarîya Daner

Ji bona Pîreka min û Hevrîya Rêya min

YI berê prşîyî çûna me di sala 1914 de didim
biprşkeşkirin.
NAVROK
Pâşgotina Kurmancî 1
Derîyê Pâşî9
Li Rusya de 12
Li Faris de 13
Li Turkîyê de 14
Derîyê Duwem
Mêjûwa Kurd 17
Derîyê Siyem
Jîyana Rojane -Desteyên Çivakî- Kesitîya Kurdan 31
Derîyê Çarem
Ziman - Wêje - Nivîsandin 35
Derîyê Pêncem
Oldarî 46
Derîyê Şeşem
Sincîya Kurd 58
Derîyê Heftern
Rewşa Pîrekê -Pêwendî ligel Miletên din de- Pirsiyarîya Kurd 73
Derîyê Heştem
Kurd li Rusya de 83
Pêşgotina Dr. Kemal Mezher ya Erebî 87

Kurd Nevîyên Mîdya 89

Kar û barên Daner di warê Xwendekarîyên Kurdî de 98

Pâşgotina Kurmancî

Xwendevanên hêja! Vaye ez ji bona nava destên we vê Nivîsta Minoriskî Beşê yekem: Kurd, Rûnkirin û Dîtin û Beşê duwem: Kurd Nevîyên Mîdîyan bi dilxweşî û bextiyarî ve didim bidanîn.

Beşê yekem ew ji bal Dr. Maruf Xeznedar û Beşê duwem ew ji bal Dr. Kemal Mezher ji Rusî ji bona Zimanê Erebî hatîye biwergerandin. Min ev wergerandina Kurdî li ser wergerandina Erebî daye bikirin.

Ez di xwazim li vê derê de bi dil û can ve sipasî van herdu Mirovan li ser vê kirina karê hanêyî bi nerx û pir giranbuha ve bidim bikirin.

Herwehajî vê carê jî nala hercar jî bi neçarî ve ez ji Xwendevan û Rexnevanan hêvîya lêbuhurandinê li ser hemû kur û kêmanîyên vê wergerandina hanê de ji bona zimanê me didim bidaxwazkirin.

Min ev Wergerandina hanê ji bona Zimanê meyî Dê date biwergerandin, da ku Zimanê meyî xweş û perest pê bête bipêşvexistin û Gelê Kurd li ser rûpelên mêjûwa xwe de bêtir pê bête biagehdarîkirin û bişiyarkirin.

Gava ku Merov vê Nivîsta hanê bi herdu beşên wê ve ji xwe re dide bixwendin, weha rûpelekî tarîyî veşartî bi Sedan sal ve li ser gundwa kurdîyî poşandî de jiber çavên Merov tête dutakirin û bitarûmarkirin; jiber ku ev karê hanê ji bal yekekî ji gewretirîn û karnastinn Rojhilatnasên gundvanên vê Serdema me hatîye bitomarkirin. Wî nebes tenê rûpelên poşandî li ser gundwa me de dayite bihilanîn, lêbelêjî bersivên pir bi nerx, hêja ve û bêjimar hêjîbêtir li ser bingehê zanistîyê de li ser pir pirsên bê bersiv de di mêjûwa me de û herwehajî di vê deme me jî de dayite bidan. Ev karê hanêyî biçûk bi saya Minoriskî ve kêreke xweyî pir zanistîyî mezin di dû xwe de dayite bihiştin. Ev li ser tevaya me Kurdan

Tewfîq Wehbî û hîc kesekitir li ser nebû we, êtir we hîsabkirawe ke Mîriskî nûsîtewe.

Le helkewtik de korê zanyarîyi Kur le Begda em base dest kewt we goryanewe bi ser zimanê Erebî we bilawyankirdutew. Le deway belawkirdinewe mustefa Nerîman witareki le rojnemey „Hawkari“ Begdad de belawkirdewe û em rastîye pâşya da, ke baseke hê Tewfîq Wehbîye û hê Mînoriskî niye, le witareke de Mustefa Nerîman ewey pâşan dawe ke le katêk de le Lenden bowe û em rastîye le Tewfîq Wehbî xoyî bihistuwe.

Min bo ewye em rastî derxist çunke mêjû wedibê rastî bê“

Dr. Marûf Xezendar

Navnivîsandina wîna

Berlin, 31. 8. 1998“

dide bipêwistkirin, ku em pir bi hûrî, wirdî û kûrî ve vî karê hanê ji xwe re bidin bixwendin û biliberketin; jiber jê em dikarin pir di mêjûwa xwe de û hêjîbêtir di xebata xwe de ji bona Serxwebûna xwe bêtin biliberketin.

Xebata me ji bona Rizgarkirina Welatê me û Azadîkirina Miletê me nayête biserketin, ger ku em bi başî û bi rêk û pêkî ve li ber tevaya mêjûwa xwe de neyêtin bikevtin. Miletekî bê mêjû mîna Menalekî bê serpêhatî tête bidîtin.

Biserketina xebata me li ser me dide bineçarkirin, ku em şev û rojê divê di tevaya gundwa xwe de û herwehajî di tevaya mêjûwa dorhêla xwe de bêtin biliberkevtin. Divê em xwe bi xwe bidin binaskirin, ger ku em jî ji xwe re bixwazin, ku belê em jî nala Miletekî Azad di nava kurdistana xwe de bi serbestî, serfirazî, bi xweşî û bextiyarî ve bêtin bijiyandin.

Tevaya Bedbextîya me, perçekirina Kurdistana me, talankirina dewlemendîya Welatê me û bi serdejî hêjîbêtir kole û bendekirina Miletê me bi carekê ve di Nezanîya me de tête bidîtin. Ev rastîya tirş û tal li ser Zanevanên Kurd de dide bipêwist û bineçarkirin, ku ew şev û rojê ji bona pêşvexistina Zimanê me û şiyarkirina Miletê me bidin bikeftileft û bixebatkirin.

Çarekirina Pirsiyarîya Kurd di Rojhilata Navîn de li ser berjewendîya Gelê Kurdistanê de bi darê ço ve dê bête biçarekirin.

Perçekirina Welatê me, talankirin, raw û rûtkirina Dewlemendîya Kurdistana me û hêjî bi serdejî ve kole û bendekirina Miletê me ji bal Borcuwazîya Turkî, Farisî û ya Erebî jî de gewretirîn metirsîyê ne bes tenê ew li ser berjewendîya Gelê Kurdistanê de dide bipeydakirin, herwehajî pêrejî û ligeljî ew berjewendîya Miletê Turk, yên Iranî û yê Erebî jî bi ber tirsê ve dide bixistin.

Miletekî Azad Miletekî din jêrdestê xwe nade bikirin. Azadîya Miletê Kurd û pêşvexistina wî bi Azadî û pêşvexistina van Miletên hanê ve tête bigirêdan û herwehajî pêrejî Azadî û pêşvexistina van Miletên hanê jî ew bi xwe jî ve bi Azadî û pêşvexistina me Kurdan ve jî bi xwe jî ve tête vegirêdan. Weha tevaya gundwa me û

rastîya jînê bi xwe jî ve bi diyarî vê rastîya hanê jî bi hemû tirş û talbûnên xwe ve jî ji me tevan re dide biderxistin.

Tevî hemû dirbûn û hovîtîya Serdarîkirina Turkî, Farisî û Erebî jî Dostanîya van Miletan ji me re û ya me jî ji wan re tevaya dilsozî û zanebûna me û ya wan jî ji bona Welat û Miletên me û bextiyarî û xweşîya me tevan dide biderxistin. Li ser me kurdan divê ku em şev û rojê Miletê xwe li ser vê Dostanîya hanê de bidin biperwerdekirin; jiber bes û bi tenha ve em ji Miletê xwe didin hezkirin û em ji dil û can dixwazin, ku Miletê me jî nala

hemû van Miletên din li vê Cîhana me jî de bi xweşî û bextiyarî ve di nava Kurdistana xwe de bête bijîyandin. Li ser vê jî de divê ku em her û her Miletê xwe li ser rêya azadîyê û serxwebûna Kurdistanê û pêkanîna Dewleteke Milîyî Serbixwe de, li ser vê dilsozîyê de bidin biliberxistin û bişiyarkirin.

Di dabeşkirina kurdistana me de di nava Serdarîkirina Turkan, Ereb û Farisan de tevaya bedbextîya me û herwehajî ligeljî bedbextîya Miletên Iranî, Turkî û Erebî jî tête bidîtin. Ev bi xwe jî ve li ser me de dide bineçarîkirin, ku em şev û rojê vê rastîya hanê jî ji bona Miletên Iranî, Turkî û Erebî jî bidin bidiyarkirin. Bi vî rengê hanê ve û xebat li ser vê rêya hanê de dê gorîyên gihandina ermanca me di Serxwebûna Kurdistanê de û di pêkanîna Dewleteke Milîyî Serbixwe de bêtin bikêmkirin û dema gihandina wê dê bête bikurtkirin.

Xebata Miletê Kurd di vê pêla me de, belê di piştî avêtina Çekên Kimyawî û Biyolocî de ji bona nava Kurdistana Iraqê bi qonaxeke nuhî xwe ve li seranserî kurdistanê de hatîye vegihaştin.

Di vê qonaxa nuhî hanê de bi neçarî ve şêweyê Şere Kurd bi hezaran sal ve duçarî veguhertina xwe tête bikirin û pêrejî bi neçarî ve şêweyê sitratîcîya kurdîyî siyasî jî û şêweyî rêxistina wîyî siyasî jî duçarî veguhertinê tête bikirin. Ev jî tevî jî bi hemû tirşbûn û talbûnên jînêyî nehajî ve li nava Kurdistana me jî de, Xebata Miletê Kurd li seranserî Kurdistanê de ji bona Serxwebûnê û pêkanîna Dewleteke Milîyî Serbixwe dide biyekkirin û pêrejî bi serdejî ve ew bingehê vê xebatê û bi serketina wêna ve ji Kurdistana Turkî dide hîmkirin û bidestpêkirin.

Weha bi vî rengê hanê ve Hîmkirin û Bingehkirina biserketina Xebata me li Kurdistana Turkî de û ji Kurdistana Turkî tevaya rastîya jînê ji me re vê dide bipêwistkirin, ku em ji her kat bêtir ala dostanîyê di nava Miletê Kurd

de li seranserî Kurdistanê de û Miletê Turk de bi dilsozî û hêjîbêtir bi zanebûn ve divê bidin biberz û bibalakirin.

Ev rastîya hanê kêseke mêjûyîyî mezin li ser ronahîya pêşketina dema me de û hêzên kêrkirî di Rojhilata me de û herwehajî di vê Cîhana me de ji me Kurdan re dide biderxistin. Ev jî tev jî bicarekê li ser têgihiştin, zanebûn û dilzozîya me de ji bona Welat û Miletê me tête bidîtin.

Xebata Miletê Kurd bi avêtina Çekên kîmyawî ve ji bal Faşîya Ereb ve ji bona nava Kurdistana me nayête bidawîkirin, Da ku ew Dewlemendîya Welatê me (bêtir ji 90 melyon ton Neft her sal) ji xwe re bide biraw, birût û bitalankirin û bi serdejî ve Miletê me ji xwe re di Sedsalên Bîstan jî de careke din jî mîna berê ji xwe re jî bide bikole û bibendekirin. Ev avêtina Çekên Kîmyawî ji bona nava kurdistana me bi malandina Xakê kurdistanê ve ji gemara Tapanên Gurîyên, Kotîyên û Faşîyên Ereb û bi Serxwebûna Kurdistanê û pêkanîna Dewleteke Milîyî Serbixwe ve ji tevaya Dunyayê re dide bimujdekirin.

Gerjî bi avêjî ma be, dê Zarok û Pîrekên Helebçe tevaya talankrina Kurdistana me û wergirtina tola xwe ji Faşîyên, Pêxwasên, Qertelên Bexdadê bidin bisitandin.

Xebata Miletê kurd bi darê ço ve û bi hinera pêşveçûna Qanên Jînê ve dê bi Serxwebûnê û Pêkanîna Dewleteke Milîyî Yekirtîyî Serbixwe ve di Rojhilata Navîn de bête bitac û bixelatkirin.

Aramî, Aşîtî, pêşveketin û geşbûna Abûrî û Civakî û xweşbûn û bextiyarîya jînê di Rojhilata Navîn de nayête bidîtin, tanî ku Kurdistan neyête biyekkirin û Dewleta Milîyî Serbixwe di nava wê de neyête bidamezirandin.

Evaya bi xwe jî ve ji bona hemû Miletan Mafeyê Serûştî bi xwe ye. Ew nayête bidan, lêbelê dara Azadîyê her û her bi xwînê ve tête biavdan. Hîç gûman têde niye, ku dê Netewê Kurdî perçekirî

hêjî vê dara perest jî di nava Kurdistana xwe de her û her jî bi xwîna baştirîn Keç û Lawên xwe ve bide biavdanîkirin; jiber ku em jî bes û bi tenha ve nala Mirovan Serbest û Azad di nava Kurdistana xwe de dixwazin bijîn. Em naxwazin Bende û Kole di nava Welatê xwe de di vê jîna hanê de li vê dunya hanê jî de li jêrdestîya Dir û Hovan de bêtin bijîyandin.

Xwendevanên Hêja!

vaye min di nava van salên çûyî de li gora karîn û zanebûna xwe û têgihiştina xwe de ji bona Zimanê me çend ji Nivîstan ji bona Zimanê meyî şêrm û xweş ji Zimanên Bêgane dane biwergerandin; Jiber ku Kilîta Pêşveketina Xebata me û Şiyarbûna Miletê me di Serxwebûn û Pêkanîna Dewleteke Milîyî Serbixwe de di pêşveketina Zimanê me de tête bidîtin.

Zimanê me em ji windakirinê û nemanê dane parastin. Hebûna me, na hêjîbêtir tevaya Mirovanîya me bi xwe jî ve ew di pêşveketina Zimanê me de tête bidîtin; jiber vê jî her û her pê Ke^ên, Talankerên, Dagîrkerên kurdistana me di pêşîya pêşî de bi hemû nobûnê ve şere Zimanê me didin bikirin û nemana wî bi hemû konetî, kosetî, dirbûn û hovîtî ve didin bidaxwazkirin.

Ez zaro bûm, menal bûm, li nava gundê xweyî razayî li paşvemayî de bûm, di pêşîya pêşî de di jîna xwe de ez duçarî neçarî pirsiyarîya Zimanê xwe bûm.

Dêya min ez bi tûrê hevirmêşî ve ligel nan, mewîjan, xame, defter û cizû de û ligel tepikekî ji rêxê de ji bona sobê ez ji bona Hucrê dame birêkirin, da ku ez Yasîn û Quranê ji xwe re bidim bixwendin.

Gava Feqe Hesen dest bi xwendina me date bikirin, ew ligel me bi zimanekî din de dihate biaxivtin, em pê li ber nedihatin bikevtin. Min jê bi hemû zarotiya xwe ve date bipirskirin: Feqe çima tu me bi Zimanê me nade bifêrkirin?

Wî di bin çavan re li min de date bitemaşekirin û ji me re date bigotin: Evaya Zimanê şêrmî Quranê ye, yê Erebî ye, yê ku Xwedanê Mezin pê Quran li ser Pêxember de dayite bidaxistin û

ew ligel wî bi vî Zimanê perestî hanê ve hatîye bipeyivandin. Zimanê me çewt û xware.

Careke din min jê date bipirskirin: Çima zimanê me çewt û xwar tête bidîtin? Ew li ber dilê me de bi me ve pir xweş û şêrîn tête bidîtin. Çima Xwedanê me bi Zimanê me ve ligel me jî de nayête biaxivtin, ger ku ew jî bi xwe jî ve bi rastî jî ve bi Xwedanê me jî ve bête bidîtin?

Feqê di bin çavan re awirên xweyî tûj li min de didatin vedan û şiva xweyî xêzeranîyî ter li ser serê min de dida bihejandin, bivîzandin, bilivandin û bitewandin.

Lêbelê jî ji tirsa Dêya min jî wî newêrî bû, ew wê jî ji xwe re jî li gora dilê xwe jî de li ser serê min jî de bîne xwar. Min jî û wî jî ev dizanîbû.

Feqe Hesen danê êvarê hate mala me û tevaya çîroka min û xwe ji Dêya min re date bita û biderzîvekirin.

Dêya min ji min re li ber Feqe Hesen de ji min pirsî: ma gelo bi rastî ve te ev peyvên hanê dane bigotin?

Min rep û rast careke din jî jê re jî ji nû ve jî tevde date vegerandin.

Pepûk! pepûkî bi Dêya min ve hate bikevtin! Wê got: Feqe Lawo! Lawê min Xwedênenas hate biderketin.

Ew careke din jî ji nû ve ji bona ser Ola Bav û Kalên xweyî Yezîdî hatîye vegerandin.

Ji wê rojê û pêve navê minî Navmalîyî Liva ji bona Xwedênenas hate veguhertin.

Weha bi rastî ve Dêya min malika pêşîyî zayînêyê Xwedênenasîyê di nava nîvê mejêyê min de date bihîmkirin û bihilanîn.

Weha bi vî rengî ve tevaya zarotîya min ji min re bi hezkirin û perestkirina Zimanê me ve pê hate bipoşandin.

Weha ez zû bi saya Alfebaya Osman Sebrî ve di salên pêncî de bi dizî ve li pesarên bajarê Qamişlê de, li binarê kavilên bedena

Nisêbînê de, Paytextê kevnarî Mîtanî de, hînî xwendin û nivîsandina Zimanê me bûm.

Wehajî bi lez û bi bez jî ve bi dizî jî ve ji bona Zarok, Peye û Pîrekên gundê meyî pirî li paşvemayî jî de bi Mamostê gund ve ez hatim veguhertin. Min ew li gora zanebûna xwe de fêrî Zimanê meyî xweş, şêrîn û perest didan bikirin.

Di pişt re jî ji sala 1956 tanî sala 1959 de li bajarê Şamê de li Taxa Kurmancan de li ser Destên Osman Sebrî de em çend Xortên Kurd în bi în ve bi Zimanê Kurdî ve dihatin bifêrkirin.

Osman Sebrî bi hemû dilsozîya xwe ve em fêrî vî Zimanê xweş û şêrîn didan bikirin û hêjîbêtir wî em di warên siyaset û jînê de li ser tevaya pirsiyarîya Kurd, mêjûwa wî û xebata wî de didan biperwerdekirin.

Herwehajî hêjî bi serdejî wî bi hemû sadebûn ve tevaya serpêhatîya jîna xwe ji me re dida bigotin. Me tevan ji Mamostê xwe re Apo dida bigotin.

Weha ez dixwazim wergerandina vê Nivîsta hanêyî Kurdî ji bona vî Mamostê xweyî berz bidim bipêşkeşkirm.

Belkî dilê Apo hinekî, piçekî pê bidim bihênikkirin, herwehajî belkî jî ew bi Şagid^ xwe ve hinekî pê bête biserbilindkirin .

Dr. M. S. Cuma

Berlin, di çirya pêşî de sala 1989 de

Derîyê Pâşî

Da ku em Ciyografîya wî perçeyê ji Asyayê bidin binîşankirin, yê ku emê dê li ser wî de bidin biaxivtin, divê li ser me dû tiştrn naskirî Çîyayê Araratê û Dilava Iskenderonê bidin bibîrxistin.

Di vî Perçeyê Jêrî de ji Araratê û li ser dûrbûna du hezar Fersex de rêzên Çiyayî têtin bidirêjkirin û ew ligel hev de bi rengekî rast ve ji Jor ber bi Jêr de hevdû didin bigirtin, di pişt re jî ew çend rêzên Çiyayî din jî didin bipêkanîn ku ew xwe ber bi jêrî Rojhilatê ve tanî Dilava Farîsî didin bipêçandin.

Weha perçê yekem ji van rêzên hanê bi navê "Rêzên Sînorê Turkî-Farisî" ve têtin binavkirin. Ew heremê ji bona du komên Çiyayî, Gola Wanê û Ormiyê didin bidabeşkirin. Perçê duwem jê xwe tanî sînorên Turkî û Welatê Faris dide bikişandin. Ev Çiyayên berz û bala û pesarên wan, yên ku ew di navbera rêzên Çiyayên Iranî de û di Welatê Navbera herdu Çeman de têtin bikevtin, bi têgihiştina Kevnar ve bi Zagrosê têtin binavkirin. (Ez gûmandikim, ku Peyva Zagrosê ji kokeke Yunanî tête biderkevtin, ew bi xwe ve li nik Miletên Rojhilat de nayête binaskirin).

Weha Çiyayê Agrî Daxê xwe ji Araratê ber bi Jêr ve dide bikişandin. Ew xwe li piş Qafqasya de ji rêzên Çiyayên Ermenî dide bicudakirin û di pişt re jî ew xwe careke din tev li wan de dide bikirin.

Weha ger ku em berê xwe ber bi Iskenderonê ve bidin bivedan, dê emê piştî dûrbûneke kurt ji Bakurî wê de rêzên Çiyayên Dijî Torosê bibînin, yên ku ew Rûbarên Çemên Derya Reş û Welatê di nava herdu Çeman de didin

biparvekirin. Lêbelê Berê Giştîyî Beramberî Toros ber bi Jorî-Rojhilat ve ew di Sê Semtan de: di Jorî de, di Naverast de, di Torosê Ermînya Jêrî de, ber bi Faris, Mako û Araratê ve tête bidîtin .

Kanîyên bingehîyî Çemê Furatê di nava wan Dolan de têtin bikevtin, yên ku ew bi Rêzên Beramberî Torosê ve têtin vegihaştin. Ew ji Du Çeman tête bipêkhatin. Yê Yekem "Muradsû" yê ku ew bigir ji Araratê ji Dola Alaşkurt dide bidestpêkirin, Yê Duwem "Qeresû" yanjî "Furat" , yê ku ew ji Erzeromê tête biderketin.

Çavîyên Çemê Arasê di navbera van herdu Çeman de û li ser rêzên Çiyayê "Bingolê" de têtin bikevtin. Ew bi rengekî serûvaja ve ber bi Jor ve têtе biherikandin. Lêbel Muradçay û Furat ew di pêşî de berê xwe ber bi Jêrî-Rojavayî ve didin bidan. Weha Muradçay li cihekî de ji cihan xwe nêzîkî Kanîyên Dicle dide bikirin, lêbelê jî ew nikare wî dîwarê tenik jî li ber xwe de bide bibirîn. Weha bi vî rengî ve çarenûsa wî li dorhêla Xarpûtê de têtе binîşankirin û ew tev li Qeresû de têtе bikirin. Weha piştî bi yekbûna van herdu Çeman ve li Rojhilata Navînê de gewretirîn Çem têtе bipêkhatin, ku ew jî Furat (2670 Fersex) bi xwe ye, yê ku ew dixwaze, ku ew ji bona Derya Sipî bête bikevtin.

Weha ew berê xwe ber bi Jêrî-Rojava ve dide bivekirin, lêbelê Toros rê li ber de dide bigirtin. Weha ew berê xwe ber bi Rojhilatê ve dide bivekirin û di Kendava Farisî de têtе bidawîkirin.

Lêbelê Rêza Duwem, ya ku ew xwe ber bi Jêrî-Rojhilatî Isenkenderonê ve dide bikişandin, ya ku ew lipêhevçûne ji bona Çiyayên Jorî Surî bi xwe ye, ew bi navê Rêzên Toros têtе binavkirin. Ew xwe bi rengeki xweser xwe ve ber bi Rojhilat ve dide bikişandin û li nêzîka Gola Wanê de Rêzek xwe jê ber bi Jor ve dide bicudakirin û ya din dev ji Gola wanê ji Jêr û ji Rojhilat de xwe dide biberdan. Ew xwe li dorhêla Kotura û Rojhilatî wanê de nêzîkî sînorê Faris dide bikirin. Ew avgîra vê gola hanê ji beşên bilindî Zabê

Mezin dide bicudakirin (li yên tên ji xwe re bide bitemaşekirin). Ev Rêza dawî xwe ber bi Jêr ve dide bikişandin û ew Du Rêzên nuhî pirî bilind dide bipêkanîn, ku ew avgîra beşên bilind ji Çemê Diclê didin bihimbêzkirin û ew berê xwe ber bi Jêrî-Rojhilat ve didin bivekirin. Lêbelê Çemê Diclê berî ku ew xwe ji nava deştan bide biderxistin, ew heremên kêmtir ji Çemê Furatê bi ber xwe ve dide bixistin. Çiyayê "Cûdî" li nik kenarê çepî Çemê Diclê de tête bikevtin. Weha li ser Avsanên Rojhilatî de dibêjin, ku Nûh li ser de hatîye bdakevtin. Lêbelê Çîyayên Çolemêrgê ji wî bilindtirin û ew li pesarê çepê Rûbarê Dicle û Zabê Mezin de , yê ku ew bi beşên bilindî Diclê ve nayête bigihaştin, lêbelê ew di nave rasta wî de pê tête bigihaştin, têtin biketin.

Ger ku perçên bilind ji Çemê Furat û heremên Gola Wanê (Erministana Kevnar) ew bi xwe ve Cih yanjî "erdê" kevnarî be, yê ku Kurd li ser wê de hatîye biderketin, weha jî perçên Jêrî Torosê û kenarên Diclê yên çep (Botan, Xarpût û Zabê Mezin) bi xwe ve ew Welatê Zikmakîyî Miletê Kurd di Heyamên gundyî de bi xwe ye. Weha ez bawerdikim.

Ger ku em bixwazin, da ku em li Welatê Kurdan de di destpêkirina gundwê de lê bêtin bigerandin, li ser me de divê ku em xwe ji bona nava perçên Rojhilatîyî dûr û yên Jêrî bidin bixistin. Ev Hersên heremên tên: Rêzên Çiyayî Bilind li Erministanê, Kurdistana Turkî û Çiyayên Farisîyî Rojavayî de ew bi xwe ve Welatê Kurdanin.

Weha bi vî rengî ve em dibinin, ku Kurd di dema niha de li ser erdeki fireh de li nik sînorên Turkî û Farisî de ji bajarê Mendelî (ji Rojhilatî Bexdadê) tanî Arartê dijîn. Weha erdê wan sînorê me jî ber xwe dide bivegirtin û ew xwe ji bona nava Qefqasya jî dide bikişandin. Kurd ligel Ermenîyan de di tevaya hêlên Rêzên Çiyayên Erministanê de dijîn û sînorên wanî Jêrî li Turkîyê de beramberî Erzeromê tête bidawîkirin. Li Jêr Kurd de heremên fireh tanî dawîya Deştên di nava herdu Çeman de ji xwe re didin

bivegirtin. Di Rojava de sînorên wan Çemê Furatê bi xwe ye û bi rengekî hûrtir ve Qeresû bi xwe ye. Ew bi xwe ve li nik vî sînorê hanjî de nehatine birawestandin, lêbelê jî wan daye bidestpêkirin, ku ew xwe ji bona nava Asya Biçûk jî bidin birakişandin. Ew ne bes bi tenê ve heremên Jêrî-Rojhilatîyî Sîwasê jî ji xwe re didin bivegirtin, lêbelê jî Komên wanî cuda jî xwe li dorhêla Qonya de û li Kilîkya jî de didin bidîtin. Weha bi vî rengî jî ve ew xwe bi Derya Sipî jî ve didin bivegihaştin.

Weha bi giştî ve em dikarin bibêjin, ku Kurd û Çiyan ji hev nayêtin bicudakirin. Her gava ku deşt destpê didin bikirin, Kurd erd ji Ereb û Turkan re û li nêzîka Gola Wanê jî de ji bona Eremenîyan re didin bihiştin.

Lêbelê li gora Serpereştîyê de Kurd li van heremên tên de têtin bineşînkirin:

Li Rusya de

Kurd li Melbenda Yerîvanê de di perçên, ku ew bi Araratê ve têtin bivegihaştin, têtin birûniştin. Herwehajî ew li heremên cudajî de ji Hêlên erdeghan, Qazman li herema Farisê jî de rûdinên. Bi serdejî Kurd herwehajî li herema Zengezor û Ciwa^êr -Arş û Cibrayîl- jî li Melbenda Ilizabês Pol de dijîn. Li vir de divê bête bigotin, ku Kurdên van heremên hanê jî ew ne mîna kurdan di Serjimara Xelkêyî vê dawîyê de hatine bitomarkirin. Weha Serjimara Kurdan li Yerîvanê û Qarsê de di sala 1910 de 125. 000 Kes bûn, ji wan 25. 000 Kes Yezîdî bûn.

Li Fans de

Kurd li hemû perçên Melbendên Kermenşah û Kurdistan de - Senendec-, li Garus, li perçeyekî ji Ezerbêcanê de, li hemû heremên Sawçeplaxê - Mehebad Cuma- de ji Jêrî Gola Ormiyê, ji Rojavayî Çemê Tataw, ji Xêza dirêjkirî li ser dûrbûneke dirêj de li ser sînorên Turkî de di perçên Jêrî de

ji Ormiyê, ji Selmasê, ji Xoyê û Mako rûdinên . Kurdên Iranê Xelkên Kevnar di perçên Jêrî de didin bipêkanîn.

Ez bawerim, ku ew xweser ji Zarokên Mêdîyên kevnarin, yên ku ew di nava van heremên Rojavayî de ji vî Welatî hanê hatine bijîyandin.

Lêbelê Kurdên, yên ku ew li perçên Jêrîyî Rojhilatî de rûdinên, ew di Ziman û Oldarîyê de Ew bi xwe Şîîne, Alî Xwedanîne ji Cemawerên din têtin bicudakirin, ligel wanên ku ew bi hev re jî ji yek Bunyadê têtin bidîtin; jiber ku ew bi xwe ve li ser sorin, ku ew tev de bi hev re ji yek Miletî têtin bidîtin. Lêbelê der barê perçeyên Jorî ji Faris de divê em ji bona nimûne bibêjin, ku di Sedsalên Zayînêyî pêşî de Selmas Melbendeke Serbixwe dida bipêkanîn û Ermenîya ew bi navê "Kurtçîya" ve bi têg^tina "Kurdistanê" didan binavkirin. Lêbelê di babetî perçên Jêrî de ji Gola Ormîyê Kurd têde demeke derengtir tanî endazekî hatin birûnişştin. Weha li herema Sawçeplaxê de hêjî navên Turkî tanî nihajî pir jî têtin bidîtin. Bi servêdejî ve kanîyên Kurdan bi rengekî pir diyar ve didin biderxistin, ku Xuyabûna Eşîren Mokrî Merovên Eşîra Baban li Sulêmanîyê de di pêla Serdarîya Berxê Reş û Sipî de, yanî nêzîka Sedsalê Panzdehan ji Zayînê hatine bidîtin. Tevî li wan heremên binavkirî de ji yên ku ew bi carekê xurû ve nala

heremên Kurdî têtin bidîtin, herwehajî li Welatê Faris jî de Avedanîyên Kurdîyî belavkirî di heremên cuda de:

Li Xuresanê Şadîlî de, li perçên Jorî ji Qezwînê de Emîlo û li dorhêla Şîrazê de (Kalon Ebdo) têtin bipeydakirin; jiber ku ew ji bal Nadir Şah -1736-1737- de bi darê zorê ve hatin bibarkirin.

Li Turkîyê de

Kurd bi rengekî bingehî ve li Wilayeta Musilê de dijîn. Ew bi xwe ve heremeke Kurdîyî xurû ye. Lêbelê di Wilayetên Wan û Bedlîsê de Ermenî

piranîyê 60-70% didin bipêkanîn Evaya jî bi erdên dorhêla Gola Wanê ve tête bigirêdan; jiber têde pir av tête bipeydakirin. Lêbelê li Sinceqa Hekarê de, ya ku ew tanî sînorê Farisî xwe dide bikişandin û herwehajî li perçên pirî dinîjî de ji heremên çiyayî li wan herdu Wilayetan jî de piranî ji Kurdan tête bidîtin, Êlên Aşûrî li Jêrî Hekarê Çolemêrgê de di heremeke biçûkî de li ser xwe girtî de dijîn. Ew li wê derê de 90% ji Xelkê didin bipêkanîn û ew li ser Zînetê de zalin.

Kurd li Wilayetên Diyarbekir û Xarpûtê de ji hemû Miletên din bêtir jimarin. Weha bajarê Cezîrê li Wilayeta Diyarbekrê de li ser kenarê Çemê Diclê de li herema Botan de tête bikevtin. Ew nala Dergûşa Netewê Kurd tête biderketin, jê ew hatin bibelavkirin û têde jî Tevgera Milîyî Kurdî jî serê xwe date biberzkirin. Lêbelê der barê Wilayeta Xarpûtê de, hîç gûman têde niye, li ser me de divê, ku em li ser Xelkên herema Dêrsimê de bidin bipeyivandin, ya ku ew di navbera Herdû Çeman de tête bikevtin, yên ku Furat ji wan tête bipêkhatin, Kurd di vê herema hanê de piranîyê bi Heşt Caran ve beramber bi Xelkên Nekurd ve didin bipêkanîn. Ew bi Zimanê Kurdî ve, lêbelê bi Zaravayê "Zaza" ve didin biaxivtin û

Oldarîyeke wanî taybetî heye; jiber vêjî Hinekan ji xwe re dane bibawerkirin, ku ew ne Kurdin. Lêbelê ez bawermendim, ku ev Dîtina hanê ne rast tête bidîtin; jiber ku ew bi Zimanê Kurdî ve didin biaxivtin, yê ku ew ji bona Zaravan hatîye biparvekirin.

Herwehajî Mirêsên Jîyana wan jî Kurdî bi xwe ye û Oldarîya wanî Alî Xwedanî pê Eşîren Kurdayî din jî didin bibawerkirin. Serjimara Kurdan di Wilayeta Helebê de ji Serjimara Ereban kêmtir tête bidîtin.

Ragiyandinên nuh, yên ku Şahbender Tisîmerman date bipêşkeşkirin, didin bidiyarkirin, ku ji tevaya 125.000 Kes ji vê Wilayetê têde 1000 gundên kurdan têtin bidîtin. Li Wilayeta Sîwasê de Kurd Kêmbûneke Milî didin bipêkanîn. Serjimara wan bi 1000 Kesî ve tête bitexmînkirin -

Şahbender Savînov-. Li Wilayeta Erzeromê de, li perçêyên Jêrîyî-Rojhilatî de jê Kurd Piranîya pirbûnê Beramber bi Xelkên din ve didin bipêkanîn -Kurd 300.000, Ermenî 200. 000 û Turk 110. 000- "Şahbendere Gîştî Ademov". Herwehajî li Sinceqa Beyazîdê de Kurd pirbûnê bi Pêne Carî ji Miletên din bêtir didin bipêkanîn -Lênc-.

Herwehajî Avedanîyên Kurdayî cudajî li Surîyê de li ser pesarên Çiyayên Şamê jî de têtin bidîtin û di nava wan jî de Fû^gehên Kurdî jî têtin bipeydakirin -M. Hartman-.

Li Bexdadê de Serjimara Kurdan 5000 Kes -Instas Marî- têtin biderketin, ew ligel Ereban de tevlihevin. Herwehajî hin ji Eşîren Kurdîyên din Zengene, Delo... ûhd.. ew li perçeyên Rojhilatî de ji Rêya Bexdadê û Iranê dijîn -Şahbendere Gîştî Orlov-.

Sermijara Gîştî ji bona Kurdên li Turkî de nêzîka 1.700.000 Kes têtin biderketin (Eviryanov).

Weha ger ku em Serjimara wan li Farisê de bi nêzîka Yek Milyon Kes bidin bidanîn, weha dê Serjimara Kurdan bi Gîştî ve bi rengekî texmînkirî ve di nava wan jî de Kurdên li Rusya jî de nêzîka Du Melyon û Nîv tanî Sê Melyonan bêtin biderketin.

Weha divê bête bigotin, ku pêrabûna yekane ji bona dana wêneyekî Etnografîyî gîştî ji bona Welatê Kurdan ew bi xwe ve

Neqşa Serheng Kartisov bi xwe ye. Ew bi xwe ve, weke ku ez bawerim, li Rojava de ne bi nav û deng ve tête bidîtin . ew bi xwe jî ve jiber hoyên teknîkîyî xurû nikare bête bikaranîn; jiber vê jî em dikarin ji dêlva wêna jî Neqşeke din ji bona raxistina heremên Kurdan bidin bikaranîn, ji yên ku ew li Turkîyê de rûdinin. Ew Neqşa hanê jî bi xwe ve di Nivîsta Endamê Civata Gîştîyî Birîtanî de Mark Sayiks de hatîye bibelavkirin , yê ku ew bi

xwe ve ji Karçinasên Etnogirafîya Kurdî û nemaze li ser Kurdên Turkî de bi taybetî ve têtе bidîtin.

Herwehajî ragiyandinên amarîyî pin din li ser Eremenîyan, Kurdan û yên din de di Belgeyên Mîrîyî ji Belavokên Wizareta Derveyî "Rastkirinên li Erministanê de" 1915 de hatine bibelavkirin.

Derîyê Duwem Mêjûwa Kurd

Koka Kurdan yanjî bi gotineke hêjî hûrtir ve Peydabûna wanî pdşî li Kurdistanê de nala pirsiyarîyekê têtе bidîtin, ku hêjî li dora wê de gift û go têtin bigerandin û li ser wê jî de hêjî bîr û bawerîyên dijbihev têtin biderketin. Nivîsvanên Kilasîkî navên pir didin bianîn, yên ku ew bi rengekî pir hûr ve nala peyva Kurd têtin biderketin, gava ku ew li ser Xakê Kurdistana niha de didin bipeyivandin. Weha bi vî rengî ve tanî demeke kurt jî bi nav û deng bû, ku Kurd ji Nevîyên Kardoxan têtin bidîtin, yên ku Zeynefon ew dîtibûn û wî ligel wan de di sala 401 de Berî Zayînê dabû û sitendibû, gava ku wî Rêberîya Deh Hezar Yunanî dida bikirin. Weha ev bîr û bawerîya hanê di vê dema dawî de hate biveguhertin; jiber hinek ji Zanistvanên niha wan Miletan ji hev didin bidubeşkirin, yên ku ligel wan navên bi bîrxistî ve pêwendîyê didin bikirin: Beşê Yekem bi taybetî ve Kardox li ser wan de têtе bigotin, ku ew ne ji Kokeke Arî têtin bidîtin5, lêbelê

Kortîyîn, yên ku ew li perçê Rojhilat de li Welatê Kardoxan de dijîn, ew bi xwe jî ve ji Bavpîrên Kurdan têtin bidîtin. Weha bi vî rengî ve heger jî çi be, ev Miletê hanê, yê ku em li ser wî de didin binivîsandin, ew bi xwe ve li çiyayên Kurdistanê de Berî Zayînê bi çend Sedsalan ve hatîye bidîtin.

Weha em bi pir başî ve dizanin, ku ne bes tenê Kurd ji bal Zimanê xwe de Arî têtin bidîtin, lêbelêjî hêjîbêtir jî ku Zimanê wan bi xwe jî ve di nava Binemala Zimanê Arî jî de têtе bikevtin. Wehajî li ser vî bingehê hanê jî

de Welatê wan û herwehajî Zimanê wan jî li gora bîr û bawerîya min de di Rojhilat de têtin bidîtin.

Gava ku em bizanibin, ku Pêla Yekem ji Barkirina Arîyan nêzîka destpêkirina Sedsalê Heftan Berî Zayînê hatîye bidestpêkirin, wê çaxê dikare pê bête bibawerkirin, na hêjîbêtir divê bê li ser wê de bête bisorkirin, ku di vê dema hanê de, ya ku têde Mîdîyan ligel Hevalbendên xwe de di sala 607 de B. Z. -Berî Zayînê- Aşûr dane binabûdkirin, jimarên pir ji Kurdan ber bi Rojava de xwe dane bikişandin.

Weha divê li vir de bête binîşandan, ku nêzîktirîn û kevintirîn Dirawsê wan bi xwe ve Ermenî bûn, yên ku ew jî di vê dema hanê jî de bi xwe ve li Firîgya de hatin biderketin û wan ji xwe re Keyetîya Orarto dane bivegirtin. "Ew Miletekî ji Binyadekî din tête bidîtin" û wan Keyetîya xwe li Dorhêla Gola Wanê de datin biavakirin .

Weha li ser vî bingehê hanê de em dibînin, heger ku Koka Eremenîyan ji Jêrî-Rojavayî bête bidîtin, weha Koka Kurdan ji Rojhilat tête bidîtin.

Weha bi vî rengî ve herdu Pêlan Tawros ji bona Du Beşan dane bibeşkirin. Weha navê Kurdan bi rengekî serbixwe ve di nava keyetîyên Farisîyî kevin de nehatîye, ev jî dibe, ku ew di nava Melbendên Ermenîyan de dihatin bidîtin.

Ciyografîyên Yunanîyî (Sitrabo, Pêtolîmî û yên din) di pêşîya Sedsalên Zayînê de bi rengekî zor baş ve heremên (Kordoyîn) nasdikirin. Weha bajarekî biçûk bi navê (Pînak) ve dihate bidîtin, ku ew hêjî li ser çemê Diclê de tête bipeydakirin û ew bi navê (Fênik) ve tête binavkirin .

Weha niha em pêwendîya di navbera Peyva "Kordoyîn" û peyva "Korçîya" (Welatê Kurdan) de, yê ku ew ji bal Ermenîyên Arşakiyan dihate binavkirin û yê ku ew ji Selmasê û di nava Beşên Jêrî Hekarê û ji Rojava hetanî Botan de xwe dida bidirêjkirin, dikarin bidin bibawerkirin.

Wehajî gerjî çî jî cudabûn jî di Dîtinan jî de li ser çarenûsa vê Herama hanê jî de bête bidîtin, tevlivêjî rastîya li rastê de rastîyekê bi tenha xwe ve dide biderxistin, ku min ew jî ji Şarmo dayite biwergirtin, ku Beşên Jorîyî Rojhilatî ji Kurdistana Navînî xwe di bin Serdarîya Binemala Haykanê Ermenî de dida bidîtin û ew bi xwe ve biserêxwe bû û ew ji bona nava Dewleta Aximînîyan ne dihate bikevtin. Di pişt re ew ji bona Iskenderê Mezin, ji bona Ermenîyên Arşakîyan, ji bona İskender lawê Mark Antonî, ji bona Kîlopetra, ji bona Parvîyan, ji bona Romanan, ji bona Sasanîyan

(erdeşör û Şapûr), ji bona Imperatorên Romanî ji Calêrî tanî Colyan, careke din ji bona Sasaniyan, ji bona Imperetorê Bêzentî Fiyodos, ji bona Ereban, yên ku wan Mîrneşînîyrn Ermenî dane bihên^kirin û di dawîya dawî jî de ji bona Binemala Pêşîyî Kurdî Merwanîyan ya serbixwe, ya ku wê ji sala 990 tanî 1096 Zayînê de date biserdarkirin, hate bindestkirin.

Di rastîyê de di nava van heremên hanê de aramî nehate bipeydakirin û Hêrîşên Rojhilatîyî din hatin birûdan. Weha di Sedsalên Yanzdehan de Silcoqîyan herem ji xwe re dane bivegirtin, di pişt re jî Kurd hatin bineçarkirin, ku ew dijî Mexolan şerekî sext bidin bilidarxistin. Di Sedsalên Sêzdehan de Kurdan şer dijî Holako Xan û di pişt re jî dijî Têmorleng nêzîka sala 1400 Z. de, yê ku ew li Kurdistanê de li Dora Emadîyê de bi xwe hate bişikenandin, wan ew date bilidarxistin.

Weha di dawîya dawî jî de di Sedsalên Şazdehên Zayînê de hên^ên din ji Rojava hatin biderketin, ku ew jî ji bal Turkên Osmanî ve dihatin bikirin.

Weha di sala 1514 de Sernivişta Kurdistanê bi Osmanîyan ve hate bigirêdan.

Sultan Selîm Serpereştîya Kurdistanê piştî vegirtina wêna ji bona yê nêzîkî xwe ve gundvanê Hozanê Idrîs re pê date bisipartin. Ew bi xwe ve ji Kurdên Bedlîsê bû . Hinek didin bibawerkirin, ku Hozanê Bedlîsî Kurd ji

bona heremên, yên ku Eremenî li wan de dijyan, jiber hoyên siyasî dane bibarkirin, lêbelê bi rasttir ve divê bête bigotin, ku Kurd di nava van Hêlên hanê de bi demeke dirêjtir berî vê dema hanê ew hatibûn bibelavkirin.

Lêbelê ku Beşekî ji van Elên hanê bi xwe jî ve ew Koçer bûn, ev bi xwe jî ve rastî ye, lêbelê Beşê din ji bal Oldarîya Musulmantîyî belavkirî di nava wan heremên hanê de, yê ku wan şere Filetîyê didan bikirin, dihate bibelavkirin. Weha li vê derê de divê bête ninîşandan, ku Bavpîrên Selah-Edînê Mezin ew bi xwe ve ji Eşîra Rawendî bû. Wan Kon û Zomên xwe li Dora Keleha

Duwîn de didan bivedandin, ya ku ew di Sedsalê Dehan de bi herema Yerîvanê ve dihate bivegirêdan. kanîyên Kurdan dibêjin, ku Eşîra Rojkî Bedlîs û Xazo bi darê zorê ve ji Mîrê Gurcî Dawud date bisitandin. Herwehajî di nava van kanîyên hanê jî de tête bidîtin, ku Binemalên Kurdan ji sala 873 Z. Serdarîyê didin bikirin.

Ez bawerim, ku dê bi rasttir ve bête biderketin, ger Merov hin jimarên din li ser vê jimara hanê de pêbide bivekirin, yanjî ku Merov bibêje, dibe, ku ev rûdanên hanê weha di Sedsalên Dehan û Yanzdehan de hatine birûdan .

Hîç gûman têde nîye, ku Kurdan hin ji Beşên Keyetîya Ermenî bi rengekî lidûhev ve ji xwe re didan bivegirtin û weha ev vegirtina hanê di Sedsalê Yanzdehan de hate bidawîkirin. Weha bi vî rengî ve ew li pir ciyan de li ser erdê xweyî kokî de najîn, lêbelêjî divê jî ev jî ji ser bala Merov jî neyête biavêtin, ku ev pirsiyarîya hanê jî ne bi nuhî tête bidîtin, lêbelêjî jê re jî rehên wêyî gundyî yê dirêj jî têtin bidîtin û rastîya li rastê jî de pişta vê dide bigirtin, ku Erministana kevnar di van rojên me de ji aliyê Etnografî de ew bi xwe ve Kurdî-Ermenî bi xwe ye.

Kanîya Kurdîyî Mezin û Belgeya gundyî giring Nivîsta Şerefname di dawîya Sedsalê Şazdeyê Zayînê de hate biderketin. Weha têde agehdarîyên pir bi nerx ve li ser Mîrneşînîyên kurd de di pêla Serdarîkirina Sultan Selîm de têtin bidîtin.

Kenarê Çepê ji Çemê Furatêyî Rojava û hemû heremên kenarên Rojhilat ji (Muradsû) bigir di bin Serdankirina Mîrneşînîyên Kurd de dihatin bidîtin, ji yên ku wan xwe didan binaskirin, ku ew ji Koka wan Elan têtin biderketin, ji yên ku ew di nava van Hêlan de piştî belavbûna Oldarîya Musulmantîyê dihatin bijîyandin.

Weha Mîrneşînîya Bedlîsê ji gewretirîn Mîrneşînî dihate bidîtin û Mîrê wê ew bi xwe ve Danerê Nivîsta Şerefname bi xwe bû, yê ku wî têde bi dûr û dirêjî ve li ser Çandinîyê û Pêrabûnên Mîrneşîya xwe de ji avakirina Mizgeft û Bazaran û li ser Zanistvanan de hd.. dayite binivîsandin.

Herwehajî Kanî bi xwe jî ve li ser koka Kurdan de bi serbilindî û payebûn ve bi xwe jî ve pê dide binivîsandin. Ew li ser Reweşt û Sincîyên wan de dide bipeyivandin û ew li ser rûdanên şeren wan, koçkirinên Elên wan û xebata wanî lidûhev de dijî Turkî û Iranê dide bineqişandin. Weha bi vî corî ve ew li ser rûdanên mêjûwê tanî roja xwe de dide bigotin.

Di Şerefname de li ser evîndarîya Kurdan de ji bona Azadîyê wisa hatîye binivîsandin: "Sultanên Gewre, Mîrên Mezin nedikarîbûn li ser Welat û Xakê wan de bêtin bizalkirin. Kurdan ji wan re diyarî didan bipêşkeşkirin û ew bi wan kar û baran ve radibûn, yên ku ji wan Sultanan didan bidaxwazkirin û herwehajî wan ji wan re Sipahên Hilanînê didan bipêşkeşkirin, gava ku ew pê pêwist dibûn" .

Lêbelê ev zîneta hanê di Sedsalê Nozdehan de hate bidawîkirin, gava ku Rastkirvanê Turkîyî Mezin Sultan Mehmûdê Duwem Biryara Sultan Selîm li ser kurdan de date binayînkirin, yanjî bi rengekî hêjî diyartir ve wî

xwest, ku ew Kurdistanê ji nû ve careke din bide bivegirtin; jiber vêjî wî biryar bi pêrabûnên Sipahî ve dijî wan date bidan.

Ev bi xwe jî ve jê re di sala 1834 de hate bipêkhatin. Hên^ di bin Rêberîya Reşîd Paşa de hate bikirin. Di piştî vê re jî Kurd mîna

Neşînvanân Patîşahîya Osmanî bi rengekî xweser yanjî ne xweser ve hatin bidîtin.

Herwehajî vê vegirtina hanê pêrabûna Kurdan di cara pdşîn de bi Tevgereke Milî ve di salên 1843-1846 de di bin Rêberîya Bedirxan Paşa de date bihoyekirin, lêbelêjî ew biserketinê jî nehate bipîrozkirin; jiber Serdarîya Osmanî ji bona ser Kurdan Sipahekî pirî gewre date birêkirin û ew bi ser wan ve bi serketî ve hate biderketin. Bi pê vê jî Bedirxan jî hate bidîlkirin û ew ji bona Girava Kirêta hate bisorgonkirin.

Di rojên cenga Qerim -1853/56 Cuma- de Tevgereke Gelêrîyî din di bin Rêberîya Y ezdan Şêr de, ji Mirovên Bedrixan Paşa, ji yê ku ew berî niha hatîye binavkirin, hate bipeqandin.

Gava Leşkeren Turkî ji bona Bakur hatin birêkirin, da ku ew bi cengê ve dijî Rusya rabin, wê çaxê Yezdan Şêr bi Tevgera xwe li Hekarê û Botan de di sal 1855 de rabû. Wî Bedlîs û Mûsil ji xwe re dane bivegirtin û bi Jêr ve wî xwe date biserberjêrkirin. Weha wî tevaya erdên di navbera Wan û Bexdadê de ji xwe re date bivegirtin.

Şikenandina Leşkeren Turk li herema Sêrtê de pir xurt bû, wer Xelkekî pir mezin ji Karmend û Serbazên Turkan hatin bikuştin. Herwehajî divê lê bête binîşankirin, ku Tevger bi xwe ve ew hîç dijî Filan nebû, bi servajîvêjî ve Aşûrî û Yunananî jî, yên ku ew li Kurdistanê de dijyan, wan bi xwe jî ve serê xwe dane bihildan û di bin Ala Yezdan Şêr de dane bişerkirin.

Yezdan Şêr pir caran ligel Rusan de date bipêwendîkirin. Wî Peyên xwe ji bona nik wan de date birêkirin û wî ji bona wan date bipêşneyarkirin, ku

ew ligel Sipahê wan de bête bitevlêkirin, lêbelêjî tevlivêjî wî hîç bersivek jî ji xwe re neda biwergirtin.

Weha berî ku em dest bi rabûnên cengê ve di Buhara sala 1855 de bidin bikirin, Yezdan Şêr li ser sozekî derewînî Xinêzekî Şahbendera Ingilîzî Nemrûd Sam de xwe date biberdestkirin.

Weha ew hate bigirtin û ew ji bona Istenbolê hate birêkirin. Weha bi vî rengê hanê ve Tevgera wî hate bitemirandin.

Li vêderê de divê bête bibîrxistin, ku Serdarîya Osmanî bi Nîşaneke taybetî ve hemû Evser û Serbaz dane bixelatkirin, ji yên ku ew di nabûdkirina vê Tevgerê de hatin bibeşdarkirin.

Lêbelê Yezdan Şêr bi xwe ve di pişt re ew nala Qehremanekî Milî hate bidîtin û bi komeke Xweşxuwan û Meqamên Kurdîyî Gelêrî ve hate bimayînkirin. Weha Sutsin pir ji van Sitranên li ser vî Lehengê hanê de dane bitomarkirin.

Hêjî cenga 1877-1878 jî nehatibû bidawîkirin, gava ku Tevgereke din li Hekarê, Badînan Emadîyê û Botan de xwe date bidestpêkirin. Bi Tevgerê bi xwe ve kesên Eşîre bi xwe ve û bi taybetî ve Zarowên Bedirxan pêhatin birabûn; jiber yekek ji wan di Rêberîya Giştîyî Sipahîya Osmanî de Serheng bû.

Weha ji Armanca vê Tevgera hanê bû, ku ew careke din Serxwebûna windayî bide bivegerandin. Wehajî careke din jî ev Tevgera hanê jî li Sêrtê hate bivemirandin û Serokên Tevgerê hatin bigirtin. Weha bi vî rengê hanê ve ev pêrabûna bêhêvî hate bitemirandin.

Lêbelê Tevgera sala 1880 de ew bi xwe ve ligel Tevgerên din de xwe dide bicudakirin. Serokê wê Şêx Ubey-Dula bû, yê ku ew di nava Kurdistanê de xwedan nav, deng û rûmeteke pir giran û mezin bû. Wî yarmetîya Turkan di cenga sala 1878 de date bikirin.

Armanca vê Tevgera hanê bi xwe ve Dazanîna Serxwebûna Kurdistanê bi xwe bû. Şêx Ubey-Dula bi Tevgera xwe ve di nava Xakê Iranê de pê date bidestpêkirin. Hêzên wî li dorhêla Urmîyê de xwe bi serhev de dabûn bikomkirin. Gola Urmiyê di nava destên wan de bû. wan Binab dane bivegertin û wan berê xwe ber bi Tebrîzê ve dane bivekirin.

Weha di nava Şeqam û Kolanên Tebrîzê de şeren pir sext û sengîn hatin bilidarxistin û têde bergirên pir hatin bidanîn. Şahbendera me xwe ji bona guheztina Arçîvê xwe date biamadekirin. Lêbelêjî demeke pir dirêj xwe nedate biajotin, tanî ku Eşîren Mako ji bona rizgarkirina Urmîyê hatin birêkevtin.

Weha li ser sînorên me de Leşkerekî taybetî ji Xelkên Nexçuwan di bin Rêberîya Serleşker Xazov de ji bona çavdêrîyê hate birêxistin.

Faris bi libexwedaneke pir tund ve û bi taybetî ve li dorhêla Meraxe de pê hatin birabûn. weha wan di dawîya dawî de li ser kurdan de bi kişandina xwe ber bi paş ve dane bineçarkirin.

Weha di pêşîya pêşî de rût û talankirin ji rûçikên Tevgerê bûn. Min bi xwe ve ev tev bihîstin. Weha Kurdan xwe ji bona cihên xwe dane bivekişandin û hêzeke wanî têrkirî ji bona wan nema dihate bidîtin, da ku ew bi Tevgereke din rabin.

Weha G. Arakliyan, yê ku ew di wê pêlê de ji bona Ezerbêcanê nala Namenivîsê taybetî ji bona Rojnama"Deng" hatibû birêkirin. Wî di dawî de date binivîsandin : Ermenî ji bal Tevgera Ubey-Dula ziyan bi wan ve nehate bikevtin, lêbelê jimareke pir ji Farisan hatin bikuştin û ziyana wan di mal de pirî gewre bû. Serdarîya Farisî bi tundî ve date bipirotestokirin. Şêx Ubey-Dula bi xwe ve ji bona Istenbolê hate birêkirin, lêbelê wî xwe di rêya Qefqasya de ji bona Ezerbêcanê xwe date bivedizandin, lêbelêjî careke din jî ew hate bigirtin û ew ji bona Mekê dane bisorgonkirin.

Lêbelê Lawê wî Şêx Abdul-Qadir piştî şûreşê li Turkîyê de hate bivegerandin û ew niha Endamê Civata Pîremerdên Turkî ye .

Di Notan de ji vî Sedsalê çûyî de Turkan dixwestin, ku ew Kurdan ji bona bêbextîyê ligel Dirawseyên xweyî Ermenî de bînin bikaranîn, lêbelê rawestandina pirî bilind ji bal Şêx Ubey-Dula de dê her û her rûpelekî gewrî pirî sipî di mêjûwê de bide bihiştin.

Hinekan ji Hevalbendên Şdx li ser wî de pêrabûna bi serbirîna Filan ve datin bipêşkeşkirin.

Weha Şrx date bigotin: "Ji bona me Kurdan niha pêwistîya Türkan bi me ve ji bona nabûdkirina Filan tête bidîtin, weha ger em Filan bidin biqirkirin, dê Turk me jî bidin biqirkirin".

Serleşkere Giştî Şakir Paşayê bi nav û deng ve xwest, ku ew bi Rastkirinan di sala 1891 de di Wilayetên Enedolê de pê rabe û herwehajî Sipahekî bi rêxistî ve ji Kurdan nala Kozakan bide bipêkanîn. Wî ji vî karê hanê mebestdikir, ku ew Kurdan fêrî Rêstik û Tektîka cengê bide bikirin.

Weha bi rastî ve di sala 1892 de "Dibustanên Êldarîyê" li Istenbolê û li Bexdadê de hatin bidamezirandin, da ku Canê Turkî di nava cerk û hinavên Zarokên Eşîrên Ereb û Kurdan de ji Koçeran bête bibelavkirin û da ku ew ji bona Turkîyê bêtin binêzîkkirin. Tevî ku ev Dibustanên hanê jî hatin bipêkhatin, lêbelêjî ew nehatin bidirêjkirin. Weha bi cihanîna van Rastkirinên hanê ve ji bona Zekî Paşa hatin bipêsipartin, yên ku ew ji bal Şakir Paşa ji bona wî hatin bipêşneyarkirin. Weha wî ew wergirtin; jiber wî dixwest, ku ew wan ji bona kar û barên cengê bîne bikaranîn. wehajî pêrejî wî dida bibawerkirin, ku ew dê bikaribe di demeke kurt de û bi malekî kêm jî Hêzeke Çekdar bîne bipêkanîn. Wehajî bi rastî jî ve ev Sazmendîya cengê jî hate bidurûstkirin, ya ku ew di pişt re jî bi "Hemêdî" ve hate binavkirin. Hîç gûman têde niye, ku ev ji alîyê cengê de hate

biserkevtin, jibervêjî Turkan ji bona veguhertina wêna ji bona Sipahekî rêxistî ji Siwaran "Xefîf Suwarî" dane biryarkirin.

Weha Sultan Ebdu-Hemîd dixwest, ku ew Kurdan û herwehajî Elbanîyan ji bona mebestên xweyî taybetî bîne bikaranîn. Wîna li wan de dida bitemaşekirin, ku ew serên xwe ji bona yasayên bajartîyê nadin bitewandin.

Wehajî ger çibejî rewşa kurdan ji pîsbûnekê ber ya din ve piştî Dazanîna Destûrê dihate biçûyîn.

Weha bi nav û deng ve tête bidîtin, ku Tevgera Turkîya Gene bi lez û bez ve wê xwe ji bona Şovînîya Turkîyî Kotî xwe date biveguhertin. Wê dixwest, ku ew bi darê zorê ve Siyaseta turkirinê di bin durujmê pêkanîna "Welatekî Osmanîyî" Giştî de bide bieihanîn.

Weha vê Tevgera hanê dixwest, ku ew Desthilatîya Merivanîyê di navbera Serdaran de ji hev bide belavkirin û bilawazkirin, ji yên ku wan Desthilatî bi Dûndebûnê ve ji xwe re didan biwergirtin.

Weha di eneam de tiştekî pir sersûrayî hate biderketin; jiber ku kar û bar ji bal Karmendên Eneûmenan de hatin bidestxistin, ji yên ku wan ne ziman, ne jî reweşt û rabûn û rûniştinên Cihî dizanîn û hêjîbêtir ew di Serdarîkirinê de nekarnas bûn, lêbelê jî ew di pêrabûna govend û ahenga de di eejnên Mîlî de, di peyvdanên zengilî de, di girtina eivînan de li ser pişta Keştî û Gemîyan de û di ..hd... pirî şût û konbûn. Ev tevde bi hev re ji Kurdan re bêdilê wan bûn.

Hîç gûman têde niye, ku ev gotara hanê li ser mêjûwa Kurdan de dê neyête bitêrkirin, ger ku em li ser Navên wan Kesan de nedin bipeyîvandin, yên ku bi wan Zanevanên Kurd ve her û her serbilindîya xwe didin bidiyarkirin.

Selah-Edîn yekemîn Kurd bû, yê ku ew di tevaya Dunyayê de bi nav û deng bû. Ew pêkanînvanê Binemala Eyûbî bû, ya ku wê serdarîkirin li Misrê de, li Surî de û li Welatê di navbera herdu Çeman de ji sala 1169 Z. de tanî dawîya Sedsalê Sêzdehan de dida bikirin.

Wî zora Qeralê Filan li Qudsê de bir û herwehajî ew Hemberê Berberê bi serketî ve beramber bi ^ardê Yekemî Ingilîzî û Filîpê Awgostê Firensî bû.

Malbata Zendî date biserdarkirin, ya ku ew ji bal Kerîm Xanê Zendî de li Welatê Farisan de ji sala 1750 de tanî 1779 hate

bidamizirandin. Weha Serdarîkirina wîna bi canekî Mirovanîyî pirî bilind dihate bipesendarîkirin. Weha tête bizanîn. ku wan herdu Mirovên gunddar li derveyî Welatê xwe de Serdarî didan bikirin .

Lêbelê Malbatên Serbixwe di nava Welatê Kurdan de Merov dikare Merwanîyan (ji 990 tanî 1096 de) bide bibîrxistin, yên ku em li ser wan de hatin bipeyivandin. Herwehajî li ser Hesnewîyan jî de di Beşê Jêrî-Rojhilatî de ji Kurdistanê (ji 959 tanî 1015 de) Merov dikare bide biaxivtin.

Lêbelê derbarê Mîrên Serbixwe weha Mîrneşînîyên: Erdelanê, Sulêmanîyê, Badînan, Rewanduz, Hekarê, Şemdînan, Botan, Beyazidê ... hd.. dihatin bidîtîn.

Herwehajî beşekî ji wan jî tanî vê roja meyî nihajî date bidirêjkirin. Herwehajî pir Serdarên Eşîrên nihajî ew bi xwe jî ve xwedanên wan desthilatîyanin, yên ku pê Mîr^înîyên bi navkirî ve xwedanbûn, bi gotineke din ve ew jî bi xwe jî ve serbixwebûn.

Weha di beşê Jêrî de ji Diyarbekr (di Şaı^ra^ de) di destpêkirina serdema me de vî Serkê Eşîra Milî Ibrahîm Paşa bi desthilatîya Mîrekî Turkî ve dihate bidesthilatîkirin. Weha wîna ji bona xwe jî hinek ji Eşîren Erebî jî dane bijêrdestkirin. Wî Bêş û Bac ne didan û ew bi xwe ve li ser rewşê de zal bû .

Weha evaya kurtîyeke raxistî ji bona mêjûwa Kurd û Kurdistanê bû, lêbelê hoyê giştî ji bona nebûna yekitîyê di navbera wan de û cudabûna di nava wan de ew bi xwe ve di zîneta Ciyografî de tête bidîtin; jiber hebûna dolên pir, rêzên çiyayên sext, rûbarên avêyî xurt vanan bi hev re perçekirina Jîyana Siyasî û Rewşa Derebegîyê dane bikirin.

Lêbelêjî tevlivêjî Hestkirina bi Azadîyê û Serxwebûnê jî pir li nik wan de bi xurtî ve tête bidîtin û ev bi xwe jî ve ji pêkanînên hebûna kurd têtin biderketin û ev jî bi xwe jî ve di mêjûwa Tevgera Kurdan jî de têtin biwênekirin.

Herwehajî divê em kêra kurdîyî giştî li ser Ferhenga Kevnar de, di cihên ku ew têde dijîn, nedin bijibîrkirin.

Gotara Mar, ya ku me pê date binîşandan, nav û nîşaneke pir ciwan "li ser Pirsiyarîya Têgihiştina Ferhenga Miletê Kurd de di Rojhilata Navîn de" dide bihilgirtin. Hîç gûman têde nîye, ku hin ji remanên Oldarîyê, ji yên ku ew li ser Civaka Kurd de zalin, wehajî wan xwe ji bona nava Rêçikên Filetîyê û Musulmantîyê dane biavêtin .

Zimanê kurdî ji bona Miletên dorhêlê pir dida bikêrkin û hêjî ew pir dide bikêrkirin.

Wehajî em li hin Hêlên Wilayeta Bedlîsê de dibinin, ku Ermenîyan Zimanê xwe dane bijibîrkirin û ew bes û bi tenha ve bi kurdî ve didin biaxivtin . Herwehajî li nik Aşûrîyên çiyayî de "reweşteke giştîye, ku ew meqaman bi kurdî ve distrên û çîrokên Gelêrîyî Kurdî dibêjin" .

Jîyana Rojane -Desteyên Çivakî- Kesitîya Kurdan

Ji tevan re diyare, ku Kurd ji bona Êlên Koçer û yên Neşînvanî têtin bibeşkirin û ew ligel hev de û di nava hev de dijîn. Weha Êlên Koçer bi pirbûn ve li Jor de di nava herdu Çeman de dijîn5.

Pir wekhevbûnek di şrweyî jîyana wan de û Jîna Qereçîyên, yên ku ew di nava Welatê me de dijîn, tête bidîtin. Weha divê guh pê bête bidan, ku jimareke gewre ji van Êlên hanê xwe ji bona jîyana Nîvneşînvanîyê dane biveguhertin. Di Zivistanê de ew li Dolan de di Xanîyên ji qur û kelpîçan de rûdinên. Di Buharê de ew li nava werzan de dijîn û ew Hinekan ji Neferên Eşîrên xwe nala Pasevanan ji bona xwe didin bikaranîn, herwehajî ew ligel kerîyên xwe de bi serên çiyan ve têtin bihilkişandin û ew di nava Konan de (ew li dorhêla Sulêmanîyê de bi " Hewar" tête binavkirin) û pirî caran jî li Zozanan de dimînin.

Ermenîyên, ku ew li Mûşê de ji kevnar de dihatin birûniştin, saw bi rengekî taybetî ve ji cihên nêzîkî warên Koçeran bi ser wan ve dihate bikevtin. Lêbelê di Serdama niha de evaya bi xwe ve serberjêrî hevdû bûye, weke ku pê Karçînasê Hozan di kar û barê

Erministanê de Lênç tête bimukurhatin, ew dibêje: "Êlên Koçerên Kurdan li ser rêzên çiyayên Erministanê de xwedan gundên xweyî taybetî têtin bidîtin" .

Ev Êlên mezin di nava van Hêlan de ew bi xwe jî ve wan rabûn û rûniştinên hanêyî giştî ji yên Êlên dûr nala Eşîra Caf li Şehrezore de (Koka vê Eşîra hanê ji Iranê tête bidîtin) didin biparastin.

Di rêketina Êlan de rûçikên pirî sersuranê têtin bidîtin. ew bi roj bi ser rê ve dikevin û bi şevê ve li qonaxên nîşankirî de didin bixewkirin û ew Peyên xwe li ser qafên çiyan de didin bihiştin.

Weha jimarek ji Eşîrên Kurdan li hinek cihan de ji bona "dijî Milîya kurdî", ger ku Merov bikaribe bide bigotin, hatine biveguhertin. Ev xuyanîya hanê jî pirî caran jî Merov wê li cihên dûrketî de yanjî ji yên li ser sinorê Milîyî Miletê Kurd de dide bidîtin.

Lêbelê derbarê Zîneta Civakî de Kurd bi rengekî giştî ve ji bona Êlan têtin bibeşkirin. Eşîr ji Du Çînîyan tête bipêkhatin:

Yekem ji Şervanan, ew bi xwe Serokin (Axa), Xwedîyên erdan û Peyên xwe,

Duwem ji Cotkaran (Goran/7, yên ku ew nala Nîvbendên erdê lêbelê bi rengekî nermtir têtin bidîtin.

Hestkirina pêwendîyên Malbatîyê, nemaze pêwendîya ligel Axê de ew bi xwe ve hestkirineke pir bi serbilindî ve bi Merivanîyê ve tête bidîtin, tanî ku ew bi pileyekî bilind ve hatîye

bigihaştin, ku ew hestkirina hanê bi xwe ve nala beşekî ji Hebûna wan tête bidîtin .

Li pir cîyan de li Axê de bi çavekî pirî bilindî ve bi serkevtî ve lê tête bimeyzekirin û li Xelkên din de bi çavekî din ve li wan de tête bitemaşekirin, ku tê bêje, ew ji Tuxmekî din têtin bidîtin.

Bi rastî jî ve divê bête bigotin, ku di Kesîtîya Axê jî de rûmet û comerdî tanî pileyekî pirî bilind têde tête bidîtin, ku Merov ji awira pêşî de dikare wî ji cotkaran bide bicudakirin. Di Kesitîya Axê de karîneke pirî berz û bala ji bona zalbûnê tête bidîtin.

Wehajî ji bona bicîhkirina rastîya vê Dîtina hanêjî ji alîyê mêjûyî jî de divê em bêjin, Ku Bav û kalên Eşîra Şikakan jî dikarîbûn Xelkên Kevnar bidin binabûdkirin, ji yên ku ew li heremên nala Kotur, Soma û yên din dîjyan.

Bi rengê giştî ve Kesitîya kurd tanî radeyekî tête bicudakirin, ku bi me ve pir dijwar tête bidîtin, ku em bikaribin pişta xwe bi rûçikên Intropolocî ve bidin bigirêdan . Jibervêjî Merov dikare li nik Kurdan de rûwê guroverî Ermenî û yê Samîyî Erbî, yanjî bi bêtirbûn jî ve yê Aşûrîyî File bide bidîtin.

Lêbelê Kurdên li herema Sulêmanîyê de bi rengekî giştî ve li ser Kesitîya xweyî Iranîyî qenc de dane biparastin; jiber ku ew dûrî Miletên din dihatin bijîyandin.

Weha Nivîsvanê Ermenî Abovyan bi vî rengî ve Kesitîya Kurdî dide bipesinandin:

"Merov dikare Merevê Kurd ji awira pêşî bi mêranîya wî ve û bi bejna wîyî bilindî bi tirs ve bide binaskirin, ya ku ew bi xwe jî ve di wê demê bi xwe jî de bi tirsê ve qerfê xwe dide biderxistin. Bi servêdejî ve rûwê Merovê Kurd jî bi çavên mezinî agirî ve, bi

biruwên pir bi tov ve, bi anîyeke bilind ve, bi pozxwarîyeke dirêj ve, bi xêz û dêrên pirî xurt ve, yanjî bi gotineke din ve bi hemû rûçikên Pehlewanên Kevnar tve ête binîşankirin".

Weha divê lê bête binîşandan, ku Kurdên, yên ku ew li perçên Rojavayî ji îranê û Lor de dijîn, ew bi xwe ve ji Êlên Koçer ji Miletên Hindû-Ewropî tanî niha bi tenha xwe ve ew mane.

Ziman - Wêje - Nivîsandin

Zimanê Kurdî ji Malbata Zimanên Îranî ye, weke ku ew tête binaskirin, ji Zimanê Farisî, Afxanî, Bilocî, Astînî û ji hin Zaravayên kevin û nuhî din tête bipêkhatin.

Zimanê Kurdî ew bi xwe ve ne Farisîyeke veguhertî ye, lêbelê ew bi xwe ve bi serêxwe ye, jêre qanûnên wîyî fonîtîkî û sintiksîsîyî taybetî têtin bidîtin. Pêwendîya wî ligel Zimanê Farîsî de wek pêwendîya Surbî ligel Rusî de, yanjî hêjî hûrtir mîna pêwendîya Zimanê Adîyî Siwêsrîyên Çiyayî ligel Italî de tête bidîtin.

Bi diyarî tête bidîtin, ku Bavpîrê Farisî ew bi xwe ve Farisîya Naverast (pehlevî) bi xwe ye. Zimanê Farisîyî kevin ew bi xwe ve zimanê nivîsandinên mêjûyî bi xwe ye.

Lêbelê Zimanê Kurdî ew bi xwe ve ne bi vî jî û ne bi wî jî ve pêwendîyekê dide bilidarxistin. Herwehajî bi xwe jî ve ew pêwendîyeke xweser bi Zimanê Îranîyî kevnî Duwem (yê Avista) jî ne nade bidîtin, yê ku Nivîsta perest (Avista), Nivîsta Ateşperestan pê hatîye binivîsandin .

Weha bawerîyek tête bidîtin, ku Zimanê kurdî mîna piranîya Zaravayên nuh li Iranê de pir ji perçeyên pêkananîna xwe ji zimanê Mêdîyî windabûyî dayite bisitendin. Mîdya bi xwe ve ew patîşahî ye, ya ku wê li Irana kevnar de serdarîdikir.

Zinamê Kurdî ji bona pir Zaravan tête biparvekirin:

1. Zaravayê Jêrî: ew bi xwe ve ji Zaravayên Kermenşah, Senendec ... hd. tête bipêkhatin.

2. Zaravayê Rojhilat: ew bi xwe ve ji Zimanê Sulêmanîyê û Sawçeplax tête bipêkhatin.

3. Zaravayê Rojava: ew bi xwe ve bigir li tevaya Hêlên Kurdistanê de tête bibelavkirin.

Weha Kurdên Rojhilat û herwehajî Kurdên Rojavayî jî Zimanê xwe bi "Kurmancî" ve didin binavkirin, tevî ku Kêmanî jî bi Zaravayê Rojhilat jî diaxivin, lêbelêjî wê paqijîya xwe li ser peyvkirina xwe de dayite biparastin . Ji nîşanên cudabûna di navbera herdu Zaravayên Rojhilat û Rojava de tête bidîtin, ew Bernavê Tekî Peyvdar bi xwe ye. Weha di Zaravayê Rojhilat de "Men nazanim" ew di Zaravayê Rojava de bi "Ez nizanim" tête biveguhertin. Ev herdu têgihiştên hanê jî bi xwe jî ve ew bi diyarî jî ve ligel Silavî de têtin bimînahevkirin; jiber ku ew hemû ji kokeke yekbûyî têtin biderketin.

Wêjeya Gelêrî li nik Kurdan de pir bi dewlemendî tête bidîtin û di nava wê de çîrokên pir bê jimar li ser rabûn û rûniştinên Milî de têde têtin bipeydakirin. Têde Sitran û Goranî û bi taybetî ve sitirana liberxwedana

Keleha Dumdum (ya ku ew li Jêrî Gola Urmiyê de û li nêzîkî Çemê Rewandûzê de tête bikevtin), ya ku ew ji bal Şah Abasê Farîsî de hate liserhên^kirin, tête bidîtin. Bi vê sitirana hanê ve Kurd bi evîndarî û serbilindayî ve pê didin bisitirandin. Herwehajî pêrejî ew bi xwe ve di nava xwe de rûdanên pir bi rastî jî ve dide biderxistin. Herwehajî li nik Kurdan jî de Destana Milîyî Taybetî bi wan jî ve "Mem û Zîn" jî tête bidîtin. Ew bi xweşxuwanî û bi çîrokî jî ve li tevaya kurdistanê de

pê tête bisitirandin: Mem û Zîn Du Evîndar bûn, lêbelê jî Mem ne di rêza endazîya Dildara xwe de ji bal zîneta Civakî de dihate biderketin. Weha Mîrê Botan li ser evîndarîya Memê de hate biagehdarkirin, yê ku ew bi xwe ve Birayê Zînê bû. Bi vê ve ew li ser Memê de hate bitûrekirin û jibervêjî wî ew date bizindankirin.

Lêbelê jiber tirsa Serhildana Gelêrî Mîr xwest Mem bide biberdan û li ser mêrkirina wan ligel hev de ew pêhate birûniştin.

Lêbelê Mem di nava evîndarîya xwe de hate bimirin û li ser vê jî de bi xwe jî ve Zîn jî hate bimirin.

Weha ew herdu li kêleka hevdû de hatin biveşartin. Pir gul di navbera herdu Gorên wan de nala nîşana vê evînê, ya ku ew ji mirênê xurttir tête bidîtin, hatin bişînkirin .

Hunera Xweşxuwanîyê li nik Kurdan de pir bi firehî ve tête bidîttin. Rewşene, ku em nikarin berkirin Xweşxuwanvanên wan baştir jiberkirin xweşxuwanvanên Muslmantiîyê bidin biderxistin, lêbelêjî di hemîn kat jî de li ser me de divê, ku em bidin bi bîrxistin, ku qelsbûna di xwendekarîya Zimanî de bi gihandina vê bawerîya hanê date bikêrkirin.

Heşt navên ji Xweşxuwanvanên Kurdên kevnar bi nav û deng û nasin . Kevintirîn Kes ji wan bi xwe ve ew Melê Cezîrî ye, yê ku ew di Sedsalê yanzdehên Zayînê de hatîye bijîyandin. Weha li ser şêweyê Lêtografî

berkirinên wîna ji bal Hartman li Elemanya de der sala 1904 de hatine bibelavkirin. Weha Rojhilatnasîyê karşînasîyeke wisa nikarîbû bida bipeydakirin, ku wê dê bikarîba vê Dîwana hanê bide biwergerandin.

Di derbarê serdema nuh de ez didim bibawerkirin, ku Navînîya Bingehî ji bona xweşxuwanvanên Kurdan ji bona bajarê Sulêmanîyê hatîye biveguhestin. Weha li wê derê de Xweşxuwanvanê pir bi nav û deng Nalî hatîye bijîyandin.

Weha ji bona nimûne li ser Xweşxuwanên kurdî de em van herdu nivîsandinên tên didin bipêşkeşkirin:

- 1 -

Zulfet le qedit dake perîşan û belawe Em ro le minî şifte aloze û belawe Bo çi negirîm sed keretim dil şikînî Mey bo çi nerjî şûşe li sed lawe şikawe

- 2 -

Her çende ke rûtim be xweda mayîlî rûtim. Bê berkîyî ilet ke Hetî û meylî hetawe

Her wehajî vaye çend let ji sitirana Gelêrîyî Kurd didim bipêşkeşkirin.

- 1 -

Hey lê lê Eyşa^, çîya pirî bilindin, ez nikarim te bibînim.

Min çend dixwest, ku ez destên xwe di nava destên te de bidim bixistin, bibadan, bipêçan û bigivaştin.

Li vê derê de, li vê Holê de, li vê dêrê de, li vê hêlê de, li vê dunyayê de kesek nala te, dîdara te, mîna te nayête bidîtin.

Ezê dê tenbûrekê, sazekê ji çardeh têlan bidim bisazkirin, çbiêkirin, da ku ez derd û kulên xwe, jana nava dil û hinavên xwe di nava wan tilan de ji te re bidim bilêdan û biderxistin.

Ezê dê tenbûrekê, sazekê ji hesîtîyên çûkan bidim bisazkirin û dê ezê têlên wan ji biskên Bûkan bidim biçêkirin.

Hey lê lê Eyşa^ tu Patîşaha mine, na hêjîbêtir tu dilê min bi xwe ye.

Tu niha gula bişgivandina buhara jîna mine.

Bavé teyî bêbav bi awirên xweyî tûj ve di bin çavan re li min û te de dida bitemaşekirin.

Wê gava, hingava ku ew min ji bona nava goré bidin biavêtin, debera Eyşana min, şrrina berdilé min li ber kéla serê min de bête birawestandin û ji min bide bipirskirin:

ma çi bi te hat! ma çi derd û kulên te bûn! tu ronahîya herdu çavên min bi xwe bû, tu şériné ber dilê min bû44.

(Ev sitirana hané ji Kurdî ji bona Rusî û ew ji Rusî ji bona Erebî hatîye biwergerandin û min jî ew jî ji Erebî careke din jî bi şêweyekî firehtir ve li gora zanebûna xwe ji bona Kurdî dayite bivergerandin. Ez pir hévîya lébuhurandiné dikim, jiber ku ew ne koka xwe ye. Cuma).

Debera Rexnevanén dilhişk gotina Poşkîn li ser sitiranén Qefqasî de careke din jî ji xwe re bidin bivegerandin, debera ew careke din jî bi nebaşî jî ve li ser sitiranén Kurd jî de bidin bidérandin "ku ew Rojhilatîne, bé nafk û kelkin, lébelé jî ew jî hêjî bi hin hêjabûnên Xweşxuwanî jî ve tétin bimalkirin". Bi servêdejî ve, Tevlivîjî bi diyarî jî ve Wêjeya Kurdîyî Gelêrî bi hîç rengekî ve ew ne nala wan cûtandin û kalandinén hîç û pûc jî tête bidîtin, jê yén ku ew di vé dawîya hané de li ser rûpelên hin ji Rojnaman de di bin navé "Surûdê Kurdî" de hatine biderketin.

Livêderêjî divé bête bigotin, ku Zaravayê Goranf5 roleke pirî giring li Kurdistana Jêrî de dide bilîstin. Ew bi xwe ve bi ser Zimanê Farisî ve tête bikevtin. Weha ji bona vî Zaravayê hané şopên wîyî Kilasîkî jêre tétin

bidîtin, herwehajî tête bibawerkirin, ku ew ne ji Zaravayén kurdî jî tête bijimartin.

Bi vî Zaravayê hanê ve Evsanên Rojhilatîyî bi nav û deng ve mîna "Leylê û Mecnûn", "Xusro û Şrrin", "Xurçîdê Xawerî" û yên din pê hatine binivîsandin. Cihangerê Ingilîzî Rêç di destpêkirina Sedsalê çûyî de Destnivîsandinên van Evsanên hanê ligel xwe de ew anîn6. Ew niha bi xwe ve li Atîkxana Birîtanî de têtin bihilanîn.

Herwehajî min jî ji xwe re jî ji herema Zehaw di sala 1914 jî de çend ji Destnivîsandinên nuh ji van Evsanên hanê û hinên din jî dane biwergirtin.

Rojnameya kurdîyî pêşî bi navê "Kurdistan" ve dihate binavkirin. Ew li Qahire de der sala 1898 de hate biderketin. Di pişt re ew ji bona Cinêvê hate biveguhestin. Belavkirvanê wê Ebdul-Rehman Paşa Beg bû, ew yekek ji Zarwên Bedirxan bi xwe bû.

Lêbelê Rojnama Duwem ew piştî Şûreşa Turkî hate bidamezirandin. Damezirandinvanê wêna Şêx Ebdul-Qadir bi xwe bû, lêbelê derketina wê bi xwe ve neda bidirêjkirin. Di dawî jî de Komek ji Kurdan di nava Desteyên Xwendevan û Rojenamevanan de hatin bidîtin, yên ku wan di sala 1913 de Civata "Hêvîya Kurd" datin bipêkanîn û wê dest bi derxistina Kovara xweyî Mehane "Roja Kurd" ve date bikirin. Ji bona vê Kovara hanê berê wêyî Milî pir bi diyarî ve dihate biderketin.

Li ser bergên wê Wêneyên Gewreyên Kurdan nala Selah-Edîn û Kerîm Xanê Zendî dihatin bibelavkirin.

Wêna canê şiyarbûna Milî di nava cerg û hinavên Kurdan de dida bidadan. Herwehajî pêrejî wê pirojeyekî nuh ji bona danîna Alfe Baya Kurdî date bidanîn. Weha navê Kovarê bi "Hetava kurd" ve di sala 1914 de hate biveguhertin. Ez bawerdikim, ku ew pir dihate bibelavkirin. Weha min bi guhê xwe jî ve li heremên Sulêmanîyî dûrjî de li ser vê Kovara hanê

jî de dayite bihîstin. Weha Gewreyên Cihî û Zanevanan pir bi pirsiyarîya Kurdîyî Milî bi jêhatbûneke jîndarî û careke din ji nû ve guh pê didan bidan.

Weha Mujdevanên Pirotistantî bi alîkarîya Civatên Elemanîyî bi kar ve li Sawçeblaxê de di pêşîya cengê de bi belavkirina

Kovareke biçûk di bin navê "Kurdistan" de pê hatin birabûn . Wê gotar li ser Rêziman û nimûne ji Xweşxuwanên Gelêrî de date bibelavkirin, ji yên ku wê ew ji Nivîstokên Oskar Man didatin biwergirtin.

Herwehajî lêgerandin û Xwendekarîyên pir jî li ser Kurdan jî de û nemaze li ser Zimanê wan jî de têtin bidîtin. Tevî ku Rêwîvanên Rusî jî, yên ku ew li nava Kurdistanê de hatine bigerandin, pir jî kêmin ji wan Baron Bodî, Çîrovkov , Xanîkov , V. F. Mayyîviskî, P. A. Tomîlov, K. Sêmiryov ,

Maksîmovîç-Vasîlkoviskî û yên din .

Tevlivêjî em bi serbilindî û payebûn jî ve nikarin bidin bigotin, ku cihê Xwendekarîya Zanistî li ser Kurdan de ew bi xwe ve li Rusya de ye. Weha Akadîmîvanê Palas di sala 1787 de bi danîna "Ferhengeke beramberkirinê ji bona tevaya Ziman û Zaravan" bi

fermanekê ve ji nik Imperetora Katerîna Mezin de hate bifermankirin.

Weha di cara pêşî de li kêleka Zimanên din de 276 Peyvên kurdî jî hatin çbiapkirin.

Ji bextiyarî jî weke ku pir caran jî di mêjûwa zanistîyê jî de tête bidîtin, ku ev karê hanê jî ligel karekî din jî de di hemîn kat jî de li hev hate birasthatin.

Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku ev herdu rûdanên hanê jî hîç pêwendîyek yanjî naskarîyek di nava wan de nedihate bidîtin. Ev karê hanê jî bi xwe jî ve Yekemîn Rêzimana Zimanê Kurdî bi xwe bû, yê ku ew

bi Zimanê Italî di hemîn sala 1787 de li Roma hate biderketin û Danerê wî bi xwe ve Mujdevanê Katolîkî Mawrîzyo Garzonî bû. Daner bi xwe ve 18 salan berî derketina Nivîstê li Êmadîya dûr de dihate bijîyandin.

Weha em niha dijwarîya jînê berî Sed û pêncî salî li nava cergê Kurdistanê de dikarin ji xwe re di nava serên xwe de bidin biwênekirin.

Weha Xebata vî Bavê Garzonî û karên wîyî pir bi nerx û hêja ve Mafe bi me ve pê dide bidan, ku em wî bi nala "Bavê Xwendekarîyên Kurdî" ve bidin bidanîn.

Lêbel bê ka çawa Xwendekarîyên Kurdî di ayinde de hatin bipêşveketin! Evaya bi tenha xwe ve sûd pê ji bona Karnasan têde tête dbierketin, lêbelêjî hinek ji rewşên jirêderketî jî têtin bidîtin, ku hinek ji agehdarîyên li ser vî Miletî jî de hatine biderketin, ku ew bi xwe jî ve nala vekirineke Cîhanî jî ji bona Rojhilatnasîyê ve jî hatîye bidîtîn.

Ji Sedsalê Hîjdehan de em li ser hebûna Belgeyên gundyî, yên ku me ew dane bibîrxistin, li ser Eşîren Kurdî de didin zanîn. Ji wan re giringbûnek ji bona diyarkirina hinek ji aliyên jiyana Mîrneşînîyên Kurdî di hin pêlan de dihatin dîtin, ji yên ku li nik me de di nava wan de agehdarîyên pirî kêm û pir tevlihev dihatin dîtin.

Rêwîvanên Ingilîzî bi pir karên giran ji bona wergirtina lîstên navên van Eşîran pê hatin rabûn. Paştirîn Lîstên navên van Eşîren hanê bi xwe ew Lîstên ku ew bi destên Sipahên Rusî ve hatibûn kevtin.

Weha di sala 1828 de di nava rojên cenga Rusî-Farisî de Ceneral Soxtilîn bajarê Erdebîlê ji bal Leşkere wî de hate bivegirtin. Ji nava tiştên, ku ew jî hatin bigirtin, wehajî Nivîstxana Sefewîyî bi nav û deng bû.

Ew di pişt re ji bona bajarê Pêterborgê hate biveguhestin. Weha Belgeya gundyî Şerefname jî bi xwe jî ve ew di nava Nivîstên pirî Nivîstxanê jî de dihate bidîtin.

Bi rastî ew Destnivîsa hanê Daneyeke pirî bi nerx û hêja bû. ew bi xwe ve ji bal Daner di sala 1599 Zayînê de hatibû bixwendin û bi (rêk û pêkxistin) û wî ew ji bal xwe de û bi mora xwe ve dabû bimorkirin.

Zanistvanên me bi rengekî pirî baş ve giringbûna vê Destnivîsta hanê datin bizanîn. Weha ji bona gava pêşî Akadimîvanê Vilya Minov-Zirnov hemû Nivîsînên Farisî datin bibelavkirin. Wehajî di pişt re jî Akadimîvanê Şarmo Nivîst bi wergerandineke Firensî ve di Çar Perçan de date bibelavkirin. Wî piranîya Temenê xwe ji bona vî karê hanê date bitirxankirin .

Li herema Simolînskî de û di pêla cenga Qerem de hinek ji Dîlên Turkan dihatin bidîtin û di nava wan de Komek jî ji Kurdan dihahte bidîtin. Akadimîya Zanistîyan ji bona nava wan Mîrza Lêrç date birêkirin.

Weha wîna di cara pêşî de hinên ji Metnên Kurdîyî Zanistî date bibelavkirin.

Li ser Kurdan hinên din ji Rusên xwedanên Diploman Bîrîzîn û Dîtêl datin bigerandin. Weha ew ji bona Rojhilat di salên Çilî de ji Sedsalê çûyî de hatin birêkevtin.

Herwehajî ji van herdu Rusan bêtir jî Dudwê din jî ji Şahbenderen Rusan A. Xodizko û A. Japa xwe bi vî karê hanê ve dane bimijûlkirin. Yê pêşî bi evîndarîya xweyî mezin ve ji bona dozandinê dihate binavkirin. Ew pir digerîya û pirjî wî jî dida binivîsandin.

Weha ew li Parîsê de ligel Kurdekî Zanevan de lihevrast hat. Wî di pişt re bi Zimanê Firensî ve (di Kovara Asya 1857 de) gotarek li ser Zaravayê Sulêmanîyê (Zaravayê Rojhilatî) de date bibelavkirin.

Lêbelê Şahbender A. Japa ew bi xwe jî ve ji sala 1848 tanî 1868 li Erzeromê de dima. Weha wîna Zaravayê Rojavayî ji Zimanê Kurdî ji xwe re dida bixwenidin. Wisa bi vî rengî ve wî Komek ji Zanevanên Kurdan li

dorhêla xwe de bi serhev ve datin bikomkirin û wî bi alîkarîya wan komek ji gotaran, Ferhengek Kurdî-Firensî û Nivîstek di pevdarîyê de bi Zimanê Firesnî-Kurdî ve, herwehajî di dawîya dawî jî de wî Ferhengek mezinî Firensî-Rusî-Kurdî date bidanîn. Weha Akadîmîya Zanistîyan bes û bi tenha ve bi belavkirina herdu karên pêşî ve pê hate birabûn. Wisa herdu karên din, yên ku ji bona wan giringbûneke wanîyî zanistîyî pirî mezin hebû, di ser guhan re hatin biavêtin.

Wetov ev serbilindaya hanê ji bona min bi pişk û par ve hate biderkevtin, gava ku di rêya lihevrastinê de ew herdu karên hanê bi destên min ve hatin bikevtin.

Di sala 1913 de Lidûmayên Mirza japa hemû Destnivîsandinên Kalên xwe ji bona min dane bisipartin. Ezê dê hemû karinên xwe bidim bikarxistin, da ku ez wan bidin biçapkirin.

Weha di dawî de Pirofîsor Yegyazrov li ser Kurdên Rusya de li herema Yerîvanê de di salên Hevftêyî de ji Sedsalê çûyî de date bilêvenerîn. Ew ji Biçûkanîya xwe bi Zimanê Kurdî dihate biaxivtin; jiber vê jî wî dikarîbû pir tişt bidana bitomarkirin û pir tiştên baş jî wî dikarîbû ew bidana binaskirin . Weha Xwendekarîyên kurdî li Rusya de li Derve de bi wan ve pê dihatin birûniştin.

jiber vê jî em dibînin, ku karên Zanistvanên Elemanî Yustî, Perîm, Sutsin û herwehajî Metnên nivîsandî ji bal Makaşê Nemsawî jî ew ji bona Akadimîya Zanistî ji bona çapkirina wan hatin bisipartin.

Weha ev tev karên hanêyî Zanistîyî bi sûd ve li ser kurdan de li nik me de li Pêtersburgê de dihatin bidîtin. Weha divê bête bibîrxistin, ku di nava rojên nêzîkî çûyî de pêrabûneke Elemanîyî xurt ji bona bidestxistina vê Monopolkirina meyî Zanistî di vî warê hanê de daye bikirin. Weha Zanistvanê Elemanî Oskar Man bi alîkarîya Imperetor Vilhilm bi xwe ve bi

gera Çar salan ve li Faris û Turkîyê de pê hate birabûn. Weha wî li ser kurdan de bi taybetî ve xwendakarîya xwe date bikirin. Ma gelo ev pêtpêkirina giringîyî hanê bi xwe ve ew ne detsdirêjkirineke di nava pirsiyarîya Kurd de bi xwe ye?

Di vî warê hanê de nuhtirîn tişt ew bi xwe ve Rêzimana Zimanê Kurd ji Sonê Inglîzî bi xwe ye, ya ku ew di sala 1913 de hate biderkevtin . Ev Nivîsta hanê bi sûde û Kesitîya Daner ve bi xwe ve pir ecîbe. Weha wî xwe bi dizî date bimusulmankirin û ew demeke dirêj li Kurdistana Jêrî de bi veşartî ve di bin navê Mîrzayê Farîsî de hate bijîyandin.

Weha di dema niha de Mîrza Orbîlî li Zanistgeha Pêtrogiradê de xwe ji bona xwendindana Zimanê Kurdî dide bikarxistin. Em jê hêvîdarin, ku ew dê reweşta pêşrewîya Rusî di xwendekarîyên Kurdî de bide bijîndarkirin.

Derîyê Pêncem Oldarî

Piranîya pir ji Kurdan Musulmanên Sunînin. Ev xuyanîya hanê di berberîya Turkî û Farisî de li ser Kurdistanê de ew li qazanca Turkan de bû. Weha Turkan evaya di hêrîşa xwe de li ser Iranê de di sala 1905-1912 de ji xwe re datin bikaranîn. Wisa Ser leşkere Turkî Tahir Paşa ji bona tevaya Dunyayê re dîtina xwe date bieşkerekirin, ku tevaya Kurdan bi Dewleta Osmanî ve têtin bigirêdan. Lêbelêjî di rastîyê jî de, tev li dîtina li ser dîtina Sûnî de bi xwe jî ve, Kurd bi xwe jî ve bi Rêçeke dînî Musulmantîyê ve têtin bigirêdan, ku ew jî bi xwe jî ve Rêça Şafîyî ye û Turk bi xwe ve, weke ku tête binaskirin, ew li ser Rêça Henîfîne. Weha bi diyarî jî ve ev xuyanîya biçûkî hanê jî dikare bi hoyê cudakirinê ve bête bikirin.

Herwehajî hin xuyanîyên din jî dikarin roleke giringtir jî bidin biyarîkirin; jiber hin Malbatên Kurdan têtin bidîtin, ku ew ji xwe re dibêjin, ku ew ji Nevîyên Malbatên Xulefayên Pêşî nala Amewîyan û Abasîyan têtin

bidakevtin (li Şerefname de bide bitemaşekirin). Weha xeberek tête bigotin, ku Ala Kevnî Abasîyan hêjî tanî niha jî ew li Botan de tête bihilanîn.

Jibervêjî bi xwe ve Mafeyê Sultanên Turkan bi Xilafetê ve tête biparastin. Ev bi xwe jî ve li tevaya Cihana Musulmantîyê de bi xwe jî ve li ser de hîç nayête bilêgûmankirin . Lêbelêjî tevlivêjî

Kurd bê Istenbolê jî ji xwe re dikarin li ser rêyeke Oldarîyî nîşankirî de bêtin biçûyîn.

Weha li Kurdistana Iranê de (herema Deşta Tal li Dorhêla Banê û hin ji Eşîren din de li Zehaw) de hin Eşîrên Şîî hogirîya xwe ligel Iranê didin biparastin. Ji xweşbextîyê ez ligel hinekan ji Mayînên van Eşîrên hanê de hatim birûniştin, ji yên ku ew ligel Eşîrên din de hatine bitevlihevkirin û Bawermendîya xwe dane bijibîrkirin.

Pir bi giringî vetête bidîtin, ku em divê bidin bibîrxistin, ku Şêxên Dîndarên Kurdan xwe bi Musulmantîya Mîrî ve pê nadin bigirtin. Herwehajî tevî ku ew Sunî jî têtin bidîtin, lêbelêjî tevlivêjî rawestandinên wanî cudajî têtin bidîtin. Weha Şêxên Şemdînan û Şehrezore (li gundên Tewîle û Biyare li Hewremanê) de ew ji bona Rêya Sofîyî Neqşebedî têtin bigirêdan. Ew bi tundtir ji xeynî xwe ve, xwe bi fêrbûnên Musulmantîyê ve didin bigirtin û ew bi pakbûna xwîna Binemalên xwe û perestbûna gorên Bav û Kalên xwe ve didin bibawerkirin û bikarîna hinera veşartî di nava canê wan de didin bibawerkirin.

Ev Bizava Sofitîyê li nik me de di mêjûwê de bi nav û deng ve tête bidîtin. Pir bi başî ve bi bîra min ve tê, roja ku Evserekî Turkî ligel Siwarên xwe de ji bona nik Şêx Ebdul-Qadir Endamê Civata Pîremerdên Turkî ji bona nava cihê wî li ser sînor de hat, ew tevde ber bi wî ve bi hemû rêz û rûmetgirtin

ve hatin bipêşkevtin û wan li pêşîya wî de xwe bi hemû dilovanî ve datin tewandin û herdu destên wî ji xwe re dane bimaçkirin.

Lêbelê Şêxên Şehrezore pir bi rêz û rûmetgirtineke pirî mezin ve ne bes tenê li nik Kurdan de têtin bidîtin, lêbelêjî ji bona Tekîyên wanayî dûr di nava cergê Kurdistan jî de Xelkên Asya Navînî jî ji Welatê me jî xwe li wan de didin bigirtin. Weha Son dîtinên xwe ligel Musulmanên Bêsarbî de dide biderxistin, ji yên ku wan ji bona Şêx li Biyarê de didan biserdan, piştî ku ew ji Mekê û Bexdadê dihatin bizîvirandin.

Weha Şöxön pir bi zanebûneke pir gewre ve û bi nermbûneke piri fireh ve di fêrbûnan de li herema Sawçeplaxê de têtin bibelavkirin .

Wisa ji xweşbextîya min bû, ku ez ligel yekekî ji wan de pir caran hatim birûniştin. Ew bi xwe ve Derwrş û Sofîyek bû, Mirovekî rûliken bû, pir bi rûmet bû, xwedan agehdarîyên pir dewlemend bû û bi serdejî hêjîbêtir ve ew Xweşxuwanvanekî bi nav û deng bû. Weha Hevalê mini kevin di geryanên xwe de D. D. Bilyayêv ew jî bi xwe jî ve ligel vî Şêxê hanê jî de di sala 1914 jî de hatibû birûniştin. Derwêşan gotinên "La ilahe Ila Alah" ji xwe re û di ber xwe de didan bivegerandin û ew di pêşîya pêşî de xwe hêdî, hêdî didin bilivandin û bihejandin. Di pişt re ew li ser ahengên dengên Erebanên gewre de xwe didin bilezkirin, tanî ku ew xwe di zîneteke ne di cihê xwe de ji serxweçûyî û surketî de dibînin. Ew ji cihên xwe xwe didin biçengkirin û ew xwe bi xwe ve bi serên xwe ve lihevdin dan yanjî ew bi serên xwe ve poşan bi dîwarên Odê ve didin bidan. Ew xwe li dor xwe de bi lezbûn ve xwe didin bizîvirandin. Weha mûyên porên serên wanî dirêjî bi tov ve ji hev têtin bibelavkirin. Weha ew Kurdên hanê bi livandinên dînîtî ve radibin û ew xwe ji bona nava govendê didin biavêtin. Hîç gûman têde nayête bidîtin, "ku ev zîneta dînîtî di Bînvanan de dide bikêrkirin" . Ev dîtina hanê ji bona Ewropîyên li wêderê de tiştekî pirî seyrbû. Weha yekekî ji wan beramberî vî karê hanê tûrebûna xwe

date biderxistin û wî ji Şêx date bihêvîkirin, ku ew bi rawestandina vi karê hanê ve bide bifermankirin. Weha bi nîşaneke sivik ve ji bal Şêx de Dunya hate bibêdengkirin û Hiş hatin bisarkirin.

Weha em dibînin, ku ji bona Sofitîyê destpêkirinek wêyî taybetî têtе bidîtin, ku ew bi xwe ve xurû ne ji Musulmantîyê têtе biderketin. Herwehajî, Tevlivêjî Jîyana Oldarîya Kurdan bi

cudabûna gewre ve di Rêçikên Oldarîyê jî de têtе binîşandan. Weha Du Oldarîyên pirî sergermî sersurandî avkirî li ser bingehên perçeyên Kurdî de têtin peydakirin.

Ya pêşî ji wan ew bi xwe ve Yezidî ye . Ew li ser yasayên Bawermendîyeke pirî kevnar de têtе biçûyîn.

Weha ji bona dozandinê li ser wêjeya Ola Yezîdî de di van salên dawî de giringbûneke pirî mezin hate bidîtin. Weha bigir berî Sed salî me li ser hebûna Nivîsta wanî Oldarî de dizanî bû, lêbelê em li ser navroka wê de ne agehdarbûn.

Weha di sala 1895 de yekekî ji Mujdevanên Ingilîzî A. Barî dikarîbû metnê Erebî bide bibelavkirin, ji yê ku wî ew date bidozandin, ew bi Du Nivostên biçûk ve dihatin bidîtin, yek ji wan bi "Kitab Elcelwe" û ya din bi "Mişefa Reş" ve dihatin binavkirin . Lêbelê Keşê Katolîkîyî Erebî Anstas Marî wî Metnê wêyî Erebî ligel Metnê Kurdî de di yek demê de date bibelavkirin0.

Weha Metnê Kokî bi guhpêdaneke pirî bi çavdêrî ve di sebetekê de di serdaba perestgehê de li çiyayên Şinga^ de dihate biparastin.

Weha A. Marî di karîbû Pasevanekî Perestgehê bide birazîkirin. Wisa bi vî rengî ve wî bi dizî ve dikarîbû di nava Du salan de Daneyeke rast û durûst li gora Koka Destnivîsê de jiber bide bigirtin. Ev jî weha dihate bikirin, ku wî kaxezeke pirî tenikî bi ronahî ve li ser pelê destnivîsê de dida bidanîn û wî tîp didan bineqişandin, yên ku wan xwe di nava kaxeza tenik de

didan bidiyarkirin. Ev karê hanê pirî dijwarbû; jiber Metnê Kurdî bi tîpên veşartîyî taybetî ve hatibûn binivîsandin. Lêbelê Marî ne bes

tenê jiber Destnivîsê date bigirtin, lêbelêjî wî jî hêjîbêtir Veşartîydn wê jî ji hev datin bivekirin.

Weha di dawîya dawî de M. Bitner ev metnên hanê di belavokeke zanistî de li Vîn de di sala 1913 de date bibelavkirin.

Lêbelê tiştê ku dil pê tên bijandan, ku belê Zanistvanên Ewropayî ji kar û barên Rusî di vî warê hanê de jê sûd ji xwe re nedan biwergirtin, ku ew bêgûman jî pirî binerx bûn. Weha Şahbendere Rusî Y. S. Kartisov lêgerandinek li ser Yezîdîyan di sala 1884 de date binivîsandin. Ew têde dibêje, ku wî hinek ji perçên "Ktêba Elcelwe" bi xwe ve dîtine û wî di pişt re jî ev perçên hanê jî dane biwergerandin, yên ku hîç di rastîya wan jî de nayête bidîtin. Lêbelêjî Anstas Marî bi xwe ve wî rûmeta belavkirina wê Belgeyî giring bi destên xwe ve date bixistin. Derîyê tê li nik Kartisov bi xwe ve ew diyarkirineke nêzîkî li ser naveroka Nivîsta Yezîdîyî duwem "Misefa Reş" bi xwe ye. Musulman yezîdîyan bi Şeytanperest didin binavkirin, lêbelê niha û piştî dozandinên kanî û agehdarîyên nuh di vî babetê hanê de ev "Cinêwdana" hanê nema jêre hîç cihek tête bidîtin û ne jî ew jî hîç dujwarîyekê dikare bide biçarekirin.

Di rastîya rastîyê de Yezîdî bi xwe jî ve didin bidazanîn, ku Şeytan bi xwe ve ji wan re Xwedan "Melekê Tawûs" yanjî "Bavê Tawûs" tête bidîtin, lêbelê tête bidîtin, ku ev bi xwe ve yekek ji mşa^ Xwedanîyê bi xwe ye. Yezîdîtî bi xwe bi pirbûn ve ew xwe nala Rêçeke Dualîyî Bawermendî (yanî bi Du Hêzan bawerkirin) dide biderxistin.

Lêbelê ev Dîtina hanê bi xwe ve ne rast tête bidîtin, jiber Qencî û Xerabî ne nala dijbûnên bingehî di pêşî de (Hurmuz û Ehremen) têtin bidîtin, lêbelêjî bi servajîvêjî ve tevaya Afirandinê ji yek

kanîyê tête biderketin. Weha nîşanân Şeş (yan Heft) Fereşteyan "Bavé Tawûs, Izraîl, Israfîl, Toraîl...hd" hemû ji yek kanîyê têtin biderketin û ew bi xwe jî ve mîna afirandina ronahîyê ji ronahîyê hatine biafirandin (Agir ji Agir tête bipêkhatin).

Weha ev Cihana Dîdar ji bal van Heft Hêzan de hatîye biafirandin, ji bil Agir yê ku ew ji bal xwedan de xweser bi xwe ve vehatîye biafirandin.

Weha Şer di dîtina Yezîdiyan de bi xwe ve ew ne nala hêzeke Serûştî tête bidîtin, lêbelê ew bi xwe ve xuyanîya xwestineke azadîyî ji bal Xwedan de bi xwe ve hatîye biderkevtin û ew dê piştî lihevhatina Giştî nemana wî bi xwe ve bête bidawîkirin.

Weha Qencî bi rengekî demî ve ji canê Xwedan hate bicudakirin. Bavê Tawûs li nik Xelkên vê Rêçê de ew cihê jê re nivêjê û perestkirin bi xwe ye . Yezîdî bi veguhestina can ve didin bibawerkirin. Ew Agir û Ronahîyê didin biperestkirin. Ew pir tiştan didin biqedexekirin: Ew ne xesan, ne baqilan û ne masîyan didin bixwarin û ew ji rengê Şîn li ber xwe...hd nadin bikirin... Pîrên wanî di Civatên taybetî de bi rêxistî û herwehajî Perestgehên wanî taybetî jî ve têtin bidîtin. Perestgeha wanî Serokî bi xwe ve ew berê li La^ê de (li dorhêla Musilê de) di Dêreke Filan de bû. Di vê Dêra hanê de Şêx Edf3 hatîye biveşartin.

Vî Mirovê hanê pakbûna Oldarîya Yezîdîtîyê dayite biparastin û wî bi xwe jî ve "Kitêba Elcelwe" dayite bidanîn. Weha ji bona xweşbûna dil ku gundvanên Musulmanan vî Kesê hanêyî mêjûyî, yê ku ew di Sed salê duwanzdehên Zayînê de hatîye bijîyandin, wî nala Musulmanekî pirî qenc didin bidanîn û ew wî ji Oldarîyeke din yanjî ji bawermendîyeke din nadin bidanîn.

lêbelêjî tevlivêjî Xelkên Musulman Merqeda wîna di sala 1415 Zayînê de datin bihilweşandin, lêbelêjî demeke dirêj jî di ser vê jî re nehate

biderbaskirin, tanî ku careke din Hevalbendên wî ew ji nûve datin biavakirin.

Yezîdî di her sal de di 23 Ilunê (Sebtemeberê) de Heft rojan bi cejneke Oldarî ve cejnê didin bikirin. Layardê Ewropî bi tenha xwe bû, yê ku wî dikarîbû di nava wan ahengan de bête bibeşdarkirin. Ew ahenga şevê û limêjên di bin ronahîya mûman de û di bin dengê zurnê u daholê de dide bipesindan.

Weha di dawîya dawî de li ser me de divê, ku em bidin bibîrxistin, ku "Melek Tawûs" bi xwe ve ew wêneyekî Tawûs bi xwe ye, yê ku ew roleke pirî gewre li nik Yezîdîyan de dide bilîstin . Weha hinek ji Zanistvanan bawermendin , ku pêwendîyek di navbera peyva Tawûs û navê Babilîyî kevin "Temûz" de, xwedanê Rojê û germbûna Havînê de, tête bidîtin. Herwehajî hin ji wan Zanistvanan jî didin bigûmankirin, ku hin pêwendiyên din jî di navbera Yezîdîtîyê de û di navbera Oldarî û Rêçikên kevnar de di Welatê Navbera herdu Çeman de têtin bidîtin. Rewşen bû, ku di Sedsalê Yanzdehê Zayînê de Xelkên bajarê Heranê (li dorhêla Orfayê) Xwedanê Heyvê "Sîn" ji xwe re didan biperestkirin, yê ku ew li nik Yezîdîyan de bi '^êx Sîn" tête binavkirin .

Gerjî çawa jî be, Yezîdîtî bi xwe ve nala Rêçekê jî tête bidîtin, ku têde pir perçên pêşeyî têtin bidîtin û diyartirîn tişt li ser vê jî de

bi xwe jî ve Bawerî û Dîtinên wan li ser afirandina Şer de didin biderxistin.

Weha Amara Serjimara Yezîdîyan bi Sed Hezar Kes ve li Turkîyê (li Şîngair, Musilê, Hekarê de) de dide biderxistin û li nik me de li Qefqasîya de 25. 000 Kes Yezîdî dijîn, mîna ku Serjimara sala 1910 dide biderxistin7.

Lêbelê Oldarîya din Alî Ilahf8 ye. Ew bi xwe ve Oldarîyeke kurdîyî xurû ye û hêjî bi têrbûn ve li ser wê jî de nehatîye bigerandin. Weha kesên, yên ku ew li tiştan de bi dîtineke tenik ve didin binerin, ew bi xwe ve dibêjin,

ku pirs bi xwe ve di Xwedankirina Xelîfê Çarem Alî de tête bigivaştin. Wehajî ew Kesanan jî bîr û bawerîyên Muslmanan di Afirandinê de didin bivegerandin.

Weha pirs li nik wan Kesan de mîna veguhestina Canan bi hev re tête bidîtin, ku ev jî bi xwe jî ve bêgûman jî li nik Musulmanên bi nav û deng jî ve tête bivegerandin . Lêbelê derbarê nîşana diyar ya ku ew bi Rêça Alî Ilahî ve tête bigirêdan, ku Xwedanetî Heft

Caran li Cîhanê de tête biderketin, weha jî ew carekê jî di Alî de hate biderketin. Wehajî ligel her Xwedanekî de Çar Ferişte jî têtin biderketin, ku ew jî xwedan nîşanrn Giştîyî Xwedanin.

Alî İlahî bawermendin, ku Mohemedê Pêxember yek ji wan Fereşteyrn Hevrêyê Alî bû. Lêbelê "daxuyanîkirina veşartinan" ew bi xwe ve ne di pêla Xwedanîtîya Alî de hate bikirin, lêbelê ew di pişt wî re di Serdema Baba Xoşîn û Sultan Işaq de hate bikirin. Divê li vir de bête bigotin, ku Xwedanetî -di Dîtina wan de- ji bona Serokê Fereştan dihate bidestjêrkirin, ya ku ew bi wî ve pê dihate biyekkirin .

Alî İlahî bi veguhestina Canan ve bi hev re didin bibawerkirin. Ew dibêjin, ku mirin mîna "werdekekê tête biderketin, ya ku ew xwe di nava avê de dide biveşartin". Ew xwe li cihekî de dide biveşartin û ew careke din xwe li cihekî din de dide biderxistin.

Ji dilxweşîya reweştên wan biratîkirin (yanî ne Bira bi birakirin). Ji Reweştên wan jî, ji yên ku ew roleke giring didin bilîstin, bi xwe ve parvekirina nanekî taybetî û goştekî bi taybetî ve bi biratî ve têtin bidîtin. Vê bi xwe ve hişt, ku hinek ji xwe re bidin bibawerkirin, ku ev reweşta hanê ji Rêçikên Filetîyî kevin hatîye biwergirtin, ji yên ku wan nan û goşt li ser Xelkê de didan biparvekirin.

Lêbelê ez bawerdikim, ku evaya bi xwe jî ve ne rast tête bidîtin; jiber Rêçika Alî İlahî bi hemû dûrbûnên xwe ve û berên xweyî giştî ve ligel Filetîyî de di tu tiştî de ew bi ser hev de nagihên bigihaştin.

Alî İlahî ligel Musulmanan de her û her bi dujminatî ve dijîn. Qizil Baş, yên ku ew bi vê Rêçîka hanê ve didin bibawerkirin û yên ku ew li tevaya heremên Dêrsimê de dijîn, ew bi xwe jî ve ji bona Turkan serên xwe nadin bitewandin .

Wehajî bi xwe ve Alî İlahî, yên ku ew li Turkî de dijîn, li vê bîr û bawerîya hanê de didin bipiştgirtin û ew jî Qezil Başan ji Rêçika xwe dibînin. Weha ev bi navkirina hanê ve bi xwe jî ve ji bal Farisan ji bona pê kenînê û pê qeşmerîkîrinê bi wan ve tête bikaranîn. Weha tête bibawerkirin, ku ev Rêçika hanê xweser li îranê de hatîye biderketin û ew li Asya Biçûk de hatîye bibelavkirin.

Ji dilxweşîyê tête dîtin, ku Qezil Başên li Turkî de ji xwe re didin bibawerkirin, ku Daketina Xwedê ji bona ser erdê ji bona bi rabûna kar û baran hatîye bidîtin. Herwehajî ew didin bibawerkirin, ku Şerva^ Alî "Şûra Zilfeqarê xwe" ji bona Rusya û "Perçema Kesk" ji bona Ingilistan date bidiyarîkirin, da ku ew Turkan bidin "biqirkirin".

Weha Gervan û Zanistvanê Rusî li Wilayeta Sîwasê de di sala 1913 de ji Xelkên vê Rêçika hanê date bihîstin , ku dê Alî di sala Sihî de (yanî 1330 K.) bête bidîtin. Weha Xelkê xwe li kar didate bixistin, da ku ew pêşewazîya daketîna Xwedê bidin bikirin. Lêbelê ji dilxweşîya li hevrasthatinê hate biditîn, weke ku me berî vê date bigotin, bi rast û durûstî ve ceng bi xwe ve di dawîya sala 1330 Kocê de hate bidestpêkirin .

Li nik Alî Ilahîyan de Wêjeyeke tomarkirî bi Zaravayê Goranî tête bidîtin. Ji xweşbextîya min, herwehajî di cara pêşî jî de Destnivîsên vê Wêjeya

hanê bidestên min hatin bikevtin. Weha min yekek ji wan Destnivîsan, ku ew Nivîsta "Ser Encam" bû, date çapkirin .

Herwehajî di pêla Gera mini dawî jî de di sala 1914 de min dikarîbû Wargeha Perestî Alî Ilahîyan li gundê Pîr Diyur de (li Hewremanê de) bidim biserdankirin. Ew li pişt gir û zinarên pir sext û sengîn de tête bilûsandin. Ev warê hanê ji cihên pirî ciwanî sipehî bi dîdarên xweyî Serûştî ve tête biderketin. Herwehajî goşa din, ya ku ew li Rojavayî Zehawê de tête bikevtin, têde li wir de Mezarê Baba Yadgar tête bikevtin. Ew bi xwe ve di vî warê hanê de bêtir giringtir tête bidîtin. Weha berî min ji bona vê herema hanê Du Gervanên Rusî Baron Bodî û Serheng Çîrîkov hatibûn biserdanîkirin .

Weha Min dikarîbû li hemû veşartî û nehînîyên Rêçikî de di goşeyên cuda de li Baba Yadgar de bidim bitemaşekirin. Evaya jî tevdejî bi saya Merovên Berpirsiyarên ji Alî Ilahî hate bidîtin, ji yên ku wan bawerîya xwe bi min ve datin bisipartin û wan hemû xwestîyên min ji min re datin bicihanîn. Ji bona her bihustekê ji vî erdê hanê yadgarîyên wîyî taybetî têtin bidîtin.

Weha wan ji min re date bigotin, ku di civînekê ji yên Alî Ilahî de weha sur û bê hêşbûn bi Derwêiekî ve hatibû bikevtin, ku wî xwe ji panaya gorê xwe ji bona dola pirî kûr date biavêtin û wî di wê avêtina xwe de dida biqîrkirin: "Ho Bavê Yadgar vaye ez ji bona nik te têm. De min bide maçîkirin". Weha ev daxwaza hanêyî pirî evin ji bona Destanekê hate biveguhertin. Wisa jî ji min re Bînvanên rûdanên bi xwe jî ve datin bigotin, ku Derwêş mir û ew ji hev pirtik pirtik hate bikirin. Weha Rêber ligel min de pir nerm bûn û wan jî biserdejî mûmek ji Gorê û Camek ji çavê Perest "Keselan" ji bona Yadgarîyê ji bona min datin bidiyarîkirin.

Çûna min ji bona wê derê gelekî xweş bû. Wê dîtinên pir xweş û şêrm di nava dilê min de date bihiştin. Ez wan rojekê ji rojan nadim jibîrkirin, tanî ku ez li ser ruwê vê dunê de bêtim bijîyanndin.

Ez nikarim vî Derîyê hanê bînim bidawîkirin, bêyî ku ez letekî ji rojanên xwe li vir de nedim bitomarkirin:

"Di 21. Nîsana sala 1914 de-Şev tava heyvê bû û Esman pirî sayî bû.

Li vir û dera hanê de kavilên Kelehên kevnar li ser çiyayên nêzîk de hatine biherifandin. Lutikên çiyan xwe bi ser newal û dolên sext û seng ve û poşayî bi daristanên pir ve bi darên bi pel û pirî ciwan û sipehî ve dane xuzkirin. Komên ji Kajên tarî li dorhêla lutikên sipî de mîna hêka cûk, lêbelê pirî gewre xwe di hêlîneke keskîyî pirî bi tov ve dide bilûskirin.

Weha çirke çirka nerm ji nava cerg û hinavên çûkên pirî belavkirî mîna banga Derwêşan ya "ho ho" her û her lihevvegerandî dihate biderketin.

Herwehajî zengilên Histira min ji xwe re tinge ting didan bikirin û Pasevanê Qefqasîyî Histirên me sitirana Kobanî ji xwe re dida bisitirandin.

Belê evaya çend xewneke pirî xweş bû. Weha min Duwanzdeh salan ji bona hatina vê Hêla pirî ciwan date biçavdêrîkirin, lêbelê di dawîya dawî jî de lihevrasthatinê bi min ve ber bi vê Hêla hanê ve date bipalpêdan.

Weha her û her min di nava kevnarîyê de ji xwe re dida biremankin û hêdî hêdî pêhestkirinên min xwe ji bona ber singa kevnarîya vê Gora perestî hanê didan birakişandin.

Parastina vê goristana perest Nifşekî ji Nifşekî din ji xwe re dayîte biwergirtin û wan tevaya jîna xwe bi carekê ve di nava himbêza Perestê xwe de datin bibuhurandin.

Weha wan her û her çavdêrîya rûpelekî Mermerî di siya wan Kesan de didane bikirin, ji yên ku ji xwe re Bav û Kalên wan dabûn dîtin. Wehajî

dibû, ku hinekan ji wan jî xwe di nava civata Merovê xwedan veşartî û xwedan nivîşt Baba Yadgar bi xwe jî ve bidana bidîtin"

Derîyê Şeşem Sincîya Kurd

Sê xuyanîyên pirî gimg di hemû alîyên Sincîyî de li nik Kurdan de datin û hêjî didin bikêrkirin: Jîyana Sedsalên Navînîyî Mîrneşînîyên Kurdîyî Biçûk , Rêstikên El û Eşîrên Kurdan û herwehajî di dawîya dawî jî de bi karanîna Kurdan ve ji bona mebestên siyasîyî diritî ji bal Turkan de têtin biderkevtin. Weha dê emê li ser van pirsên hanê de bi vî şêweyê hanê ve li ser wan de bidin bilêvenerandin: Weha Abovîyan Kurdan bi "Pehlewanên Rojhilatê" ve dide binavkirin. Hîç gûman têde niye, ku ev nasîna hanê hêjî bi rengekî taybetî ve li ser têgihiştina xwe de dide biparastin, ger ku li ser Çînîya Bala de ji Kurdan (Serokên Elan û Derebegan) bête binêtkirin. Ev bi xwe jî ve bi carekê ve di warê kar û rastîyê de li ser jîyana Sedsalên Navînî de li Kurdistanê de tête bisuwarkirin.

Rewşene, ku kurd nemîna "Pehlewanên rûdilşikestî" li Ewropa de tête bidîtin, ku ev pesindana hanê jî bi xwe jî ve nîşana rûmetşikenandinr û çepelkirinê bi xwe ve tête biderketin. Lêbelêjî tevlivêjî ma ev xuyanîya hanê jî ne ji mezinbûna Kesîtîyî di Sedsalên Navîn de dihate bidîtin, ku Merov ew Xanedanê bi kal û Bapîrên xwe ve pir serbilind bû, yê ku wî pir Mirov li nik xwe de didan bixwedîkirin. wî pir ji sitiranan û nêçîrê dida bihezkirin. Bac û bêş li ser her tiştî de, ji yê ku ew li ber çavên wî de diçûn û dihatin, wî dida bikomkirin. Wî guh pê ne dida bidan, ku ew di şevên reş û tar de xwe ji cihê xwe bide bidûrkirin û ew xwe ji bona Bajêrê mezin bide bigihaştin, da ku ew Xelkên bed bide binabûdkirin.

Herwehajî gerjî kês jê re bihata bidîtin, wî bêhnekî jî ji nava destên xwe ji xwe re nedida biberdan, ku ew Bêzentîya Filetîya lawaz ji xwe re nede bitalankirin.

Weha ew cudabûna, ku em li ser wê de li Kurdistanê de hatin biaxivtin, herwehajî sernetewandina Kurdan ji bona herdu Dewletên Serbixwe Turkî û Farisî jî, xwedanîya wan bi rewşeke abûrîyî pirî baş ve, herwehajî pêwendîyên Cotkarên wan ligel Serokên xwe de, van tevan bi hev re bi carekê ve hoyê xweser ji bona pêkanîna vî rengê taybetîyî pirî baş ji Derebegîyê datin bipêkanîn.

Weha ji bona nimûne divê ku em li ser pirsa Serbilindaya Kurdan bi Tuxum û Koka xwe ve bidin bipeyivandin. Wehajî li vê derê jî de vaye ez veşartîyeke biçûk didin biderxistin, bê ka çawa Merov dikare dilxweşîyê û bextiyarîyê bi nava dilên kurdan ve bide bixistin.

Weha di rojên çûna xwe de min dikarîbû dara Bavikên Serokên Eşîran bidim biamadekirin yanjî bidanîn. Her gava ku min ligel wan de civîn didane bikirin, min ji wan re pêwendiya Pismam, yanjî Pisî Pismam ligel hev de dida bidiyarkirin. Mîna gotina ku Bavpîr Axa bi xwe ve ew lawê Apê Bayîz Axa, yan jî Pîrot Axa bi xwe ye. Vê dilşadîya hanê dilên wan pir didan bişahkirin û bixweşkirin. Ji her alîyekî ve, ji her goşekê ve gotinên bê dawî li ser de dihatin bikirin. Weha li Kurdistanê de pir Nexwendewar jiberve deh yanjî panzdeh navan ji navên Bav û Bavpîrên xwe ji xwe re didin bijiberkirin.

Herwehajî li Kurdistanê de pir alîyên jînê dilşadîyd, bênfirehbûnê û bextiyarîyê di Kelehên Serokan de didin biderxistin. Ez li vê derê jî deyana Hevalê xweyî Serdar Mukrî dixwazim bidim bipesinandin, yê ku ew bedbext bû; jiber ku Turkan di Meha Befirbarê de di sala 1914 de ew dane bikuştin, gava ku wan Tebrîz ji xwe re dane bivegirtin.

Serdar ez ji bona Dîwanxana xwe li bajarê Bûkan de di sala 1911 de datim bimêvankirin. Gava ku em li cih de nêzîk dibûn, weha di navbera her pênç deqîqan de Komeke ji Siwaran pêşewazî li me de didan bikirin. Di pişt re Lawê Serdar hate berîya me û wî li me date bisilavkirin.

Li gund ew bi xwe ve bi pêşîya me ve hat. Peyan û gundîyan li ser sifran de pir xwarinên renga rengan ji bona nava bax didan bikişandin; jiber li dorhêla goleke biçûk de jimareke ji Konan hatibûn bivedan. Firavînê, di pişt re çayê û Careke din jî Xuwarinê tev de li ser ahengê mûsîqê û sitiranan de didate bidestpêkirin.

Mêvandarî ne bes tenê ji bona me lêbelêjî ji bona Xizimetkaran jî pir birinc jî hatibû biçêkirin. Herwehajî ez herdu masîyên gewre jî nadim bijibîrkirin, yên ku ew herdu jî bi xwe jî veji bona vê Mêvandarîya hanê jî hatibûn biravkirin.

Merdbûna Serdarê Mokrî dihişt, ku Dirawsên wîna ji hemû layekî ber bi pê ve berên xwe bidin bivekirin, da ku ew ji vê merdbûna hanê jî ji xwe re sûd bidin biwergirtin. Herwehajî Xelk bi Koman jî ve ji bona demeke dirêj ji bona Mêvandarîya wî dihatin; jiber wan pir bi başî ve dizanîbûn, ku dê ew pir bi rêz û rûmet ve bêtin bimêvandarîkirin. Ez gûman nakim, ku li nik piranîya Kurdên Turkî de wehajî ev reweşt, rabûn û rûn^tinên hanê jî têtin bidîtin, mîna yên ku ew li nik Mokrîyan de têtin bipeydakirin.

Cudabûnên Ciyografî û Siyasî, Koçkirina ji vir û ji bona dera hanê di bin kêra Rêstikên hîmkirî de, Jîyana lipêhev ligel pêwendîyên Eşîrîtî bi rengî pirî xurt ve, van tevan bi hev re ber li ber pêşketina hestkirina firehîyî Civakî de li nik Kurdan de datin bidadan. Ew pir kêm caran xwe di nava gundên Gewre de û di nava bajaran de didin bicivandin.

Weha da ku em li ber canê Kurd de bêtin biliberketin, li ser me de divê, ku em li her tiştekî ji dîtina wê Malika Yekane de lêbidin

bitemaşekirin, ya ku ew her û her Remana Qenc û Bed dide bizayînkirin.

Li nik Kurdan Hestkirineke pirî xurttir beramberî Malîtîyê û Êlêtîyê tête bidîtin, ya ku ew ji ya wanî beramberî Mirovanîyê, yanjî Biratîya Oldarîyê, yanjî ew ji Hestkirina wanî firehî Milî jî bêtir tête bidîtin.

Weha me her û her pê dida bihestdikirin, li ku jî de em bihatina bidakevtin, ku Reweştin Civakî û Rêstikên Serdarîyê li dorhêla me de têtin bidîtin û her û her ew xwe bi dû me de didin birakişandin.

Lêbelê ma gelo Kurd divê pişta xwe bi kêve bidin bigirêdan, ku ew bi rastî ve di nava herdu Dewletên Turkî û Farisîyî lawz de dijîn?

Bihêzbûn û hevkarî di nava wan de bes û bi tenha xwe bi başî ve têtin bidîtin, ji yên ku ew xwe bi pêwistî ve pê didin bigirtin. Weha Mirovekî bi tenha xwe ve, herwehajî Maleke bi tenha xwe ve bes û bi tenha ve ji bona mayîna xwe di nava Êlê de dikare li ber xwe de bide bidan.

Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku Merovê Kurd bes û bi tenha ve di Êlê de liberxwedanê dide bidîtin. Weha bi vî rengî jî ve ji vê perestkirina Êlê û wergirtina tolê hatîye biderkevtin. Wehajî jiber vê jî Kurdan di cengên Turkîyî vê dawîyê de bi mêrxasîyeke pirî bê dawî li ber Êlên xwe de dane bikirin. Lêbelê derbarê rawestandina Kurdan nala kêreke alîkar ji bona Hêzên Turkî pir agehdarîyên dewlemend têtin bidîtin, (Li bal Ceneral Avîryanov de bide bitemaşekirin), lêbelê piranîya wan jî ne li kara Kurdan de têtin bidîtin, ji yên ku wan di pêşî de pir li ber xwe de dane bidan, lêbelêjî di pişt re jî bi lez ve wan ji xwe re dane bibazdan û nebes tenê wan ji xwe re Xelkên bêguneh dane bitalankirin, herwehajî pêrejî wan Hêzên Turkîyî xwe kişandî jî ji xwe re dane birûtkirin. Weha li ser me de divê, ku em bizanin, ku carekê ji caran hîç jî li nik Kurdan de rojekê ji rojan jî Welatperwerîya Turkî pê nayête bihestkirin.

Weha Yezdan Şêr bi xwe jî ve di rojên cenga Qerim de hate biraperîn, tevî ku piraniya Kurdan derveyî heremên xwe di sala 1877 de didan bişerkirin. Leşkeren Kurdan tevî pêrabûnên Şêxên Dîndar jî ber bi ji desthilanînê ve dihatin bikevtin. Weha Serleşker

Fayiq Paşa (yê ku ew di pişt re bi tawanbarîyê beramberî Dadgehê ve hate birawestandin) ji rewş û zineta Kurdan hate bimatkirin.

Weha di dawîya dawî jî de ez bawerdikim, ku Kurd dê sernivîşta xwe bi "Turkîya Gene" ve nedin bigirêdan .

Da ku wêneyekî servajî vê jî bête bidan, Merov dikare di pêşî de çîrokeke kevin ji Gervanê Firensî Pojolat bide bibîrxistin :

"Di Hên^a Hafiz Paşa de di sala 1837 de Serokê Eşîrekê di Sî salên xwe de hate berdestkirin. Ew Merovekî pirî sipehî bû û wî hevsarê kar û baran bi xurtî ve di nava destên xwe de dida bigirtin. Ew bi Peyên xwe ve pir serbilind bû.

Wî got: Ez bi earekê ve Begekî Kurdîyî din di ser xwe re nahêlim bête bidîtin, ji yê ku hîç pêwendîyek ligel me de nayête bidîtin.

Wî ev peyva hanê pir bi serbilindî û şahnazî ve her û her dida bivegerandin ...

Ligel wî de bi dirêjîya Du rojan hate bihewildan, lêbelêjî wî hîç bîr û bawerîya xwe bi earekê jî ve neda biguhertin û ew bi devjêberdanan ji Peyên xwe ve nehate birûniştin. Wî di vê pêla berdestkirinê de li ser xwe de qalûna xwe dida bikişandin. Di roja Siyem de Paşayê zordar birûniştina wî di teşteke tije de bi ava germ ve date bifermankirin. Lêbelêjî tevlivêjî Kurdê Mêrxas xurt ma û wî li serxwebûna xwe de tanî mirinê date biparastin".

Ez rê bi xwe ve didim bidan, ku ez li vê derê de bi şêweyekî euda ve rûdaneke din li ser mêrxasiya Kurdî de dixwazim bidim bipeyivandin. ya ku min ew bi herdu çavên ve dane bidîtin:

Weha Serokê Eşîra Şikakan Cafer Axa li herema Çîxrîkê (Selmasê) de berî Panzdeh salan li wir de dijya. Wî bi earekê jî ve pêt bi Desthilatîya Farisî ve nedida bikirin.

Hin caran wî xwe ji çiyê ji bona raw û rûtkirinê ji bona nava dol û deştan dida biberdan. Lêbelê cihê sersûranê bû, ku Xelkên Hejar û Perîşan bi çavekî pirî dildar ve lê didan bimeyzekirin; jiber wî bes û bi tenha ve Dewlemend didan birûtkirin û hinek ji malên wan bi wan Perîşanan ve dida bidan.

Serdarîyê destên xwe ji bona destekên sertewandina reweştî kevnar date biavêtin, weha wê ew ji bona parastina ser sînor date bidestnîşankirin. Weha Axe bi vî karê ve li rastê de hate bineçarkirin. Di pêşîya pêşî de ew bi vê destnîşankirina Mîrî ve pir serbilind bû, lêbelêjî pêlek dirêj jî di ser vê de nehate biderbaskirin, wî dev ji vê destnîşankirina hanê date biberdan û careke din ew ji bona reweşta xweyî berê hate bivegerandin.

Min bi herdu çavên xwe ve şeren nameyên vêketî di navbera Cafer Axa û Wênerên Desthilatîyê de date bidîtin. Li nik Cafer Axa de Sikretêrek nebû, ku wî bi Zimanê Farisî ve dizanî bû. Wehajî jibervêjî bi şevê jî ve wî bi rengekî dizî jî ve ji bona Şairekî Farisîyî pîr dida bibangkirin, ew bi xwe jî ve Nivîsvanê li nik Walîyê Farisî de bû û hilgirê nameyên wî bi xwe bû. Vî Mîrzayê hanê bersiva nameyên wî dida bidan, ku bi hîç corekî ve ligel dawxazên dilê Cafer Axa de nedihatin bilihevhatin. Wî bi xwe jî ve bersiva wan nameyên bi şevê ve ji bona Walî bi rojê ve dida binivîsandin. Ji bedbextîya wî di çûneyeke wîyî şevê de Peyên Walî ew datin bigirtin. Wan tiştê hebû û nebû bi serê wî ve datin bianîn.

Weha Ostandarê Ezirbêcanê piştî sûdxwarina wîna bi Quranê ve Cafer Axa bihatina xwe ji bona Tebrîzê pê hate birûniştin.

Min bi herdu çavên xwe ve Serokê Kurdî ligel Heşt Pesevanên wî de dît, yên ku ew di yek rêzê de bi qayişên rextên xwe ve hatibûn bidarvekirin.

Lêbelêjî tevlivêjî Kurdan li ser aramîya xwe de xwe datin biparastin û wan çavên xwe ji Axayê xwe bêhnekê nedan birandin. Wan xwe li dora wî de

di bazinekî de bi rêxistin ve bi ser hev ve dane bikirin û destên wan li ser lingên tivingên wan de bûn.

Lêbelêjî tevlivêjî wan nikarîbû jîyana Cafer Axa bidana biparastin, jiber ew bi bêbextî ve li ser nêrdewana Ceneralê Ostandar de hate bikuştin. Ceneral ew dabû bimêvankirin, da ku

ew xatirê xwe jê bide bixwestin. Vîlika bêbextîyê jiberê de hatibû bidanîn. Jiber ku Axe bi çend Sedan ve ji Çekdarên xwe dihate bidorkirin, weha Pasevanên Kurd dest bi berdana gulan ve dane bikirin, piştî ku wan bi çavên xwe ve mirina Serkê xwe dane bidîtin, ya ku pir xurtî di nava cerk û hinavên wan de date bikêrkirin,

lêbelê tevlivêjî ew li ser xwe de man. Ew ji bona derve nehatin bibezandin, lêbelê ji hundûr wan liberxwedana xwe dane bikirin. Vê liberxwedana hanê tirs û lerzeke pir xurt di nava dilê Peyên Ostandar de date bixistin.

Jimareke pir ji Mirovan hatin bikuştin û Kelexên wan li serdabê de hatin biraxistin. Tevî ku jî gule pir dihatin bibarandin, wehajî Kurdan dikarîbûn bêtin biderketin û ew bi Xwedîyên xwe ve bêtin bigihaştin. Hîç nema bû, ku Kurd jî di vî şere hanê jî de Ceneral jî bi xwe jî ve ji bona nava destên xwe jî bidin bidîlkirin. Lêbelê ji her çar alîyan dor li wan de hatibû bigirtin; jibervêjî wan xwe di odake vala de dabûn bigirtin û tanî tarîya şevê jî şere xwe wan dane bikirin.

Di dîwarê odê de kunek dihate bidîtin, ji ya ku lûla sobê têre dihate biderbaskirin. Weha Kurd bi ser milên hevdu ve hatin bikevtin û wan kun datin bivekirin û Hevalên xweyî Birîndar têre dane biderbaskirin û di pişt re yek li dû yê din di kunê re ji bona ser ban hate biderkevtin. Weha ji wir wan xwe di ser banên Cîranan re, di nava kolan û baxan re dane birizgarkirin.

Wetov bi vî rengê pirî gernas ve wan dikarîbû xwe ji bajarê Tebrîzêyî mezin bidin biderxistin.

Di sibeha roja din de Ceneral bi dû wan ve hate biderketin, lêbelê Kurdan jêre tepek dabûn bidanîn, ku wan têde dikarîbûn wan bidin bixapandin û biserdejî tevan bidin bidîlkirin. Wan ew ligel xwe de bi hespên wan ve tanî gundê Çîxrîkê dane birakişandin. Weha bi vî rengî ve Şeş ji heştan ji Peyên Axê hatin birizgarkirin. Herdu Peyên din ligel Cafer Axa de hatin bikuştin û ew ligel wî de li ser dergehê Qesra Ceneralê Ostandar hatin biwerîsvekirin. Weha Rojnameyên rojaneyî cihî di roja din de pir bi ser bilindî ve li ser vê siyaseta hozanîyî hanê de datin binivîsandin.

Weha di piştî derbasbûna pêne salan de li ser vê rûdana hanê de ez li Kotûrê de ligel wan hemû Kesên di wî şere hanê de beşdarkirî hatim birûniştin. Weha min pir tişt ji wan date bihîstin, ji yên ku min di wê çaxê de li Tebrîzê de nikarîbû bida bitomarkirin.

Ev mêrxasîya wehayî Kurdayî bêqam û ev şêweyê wanî hanê li ser her Kesekî de dide bineçarkirin, ji yên ku ew dixwazin li dijî wan de bidin bikarkirin, di pêşî de divê ew ji wan re ji xwe re hezar û yek vegirtinê bide bidanîn.

Wehajî ne bi xurayî jî ve em li nik Firs û Turkan de vegerandina gotina Pêşîyan li nik Ereban de dibînin "Ku Kurd desteyekî ji Cunan têtin bidîtin".

Hîç gûman têde niye, ku dê ev mebesta hanê bi dirêjî ve li ser de di ayinde de bête bigiftûgokirin, lêbelêjî tevlivêjî dê danîna meyî bingehî jî bi hemû hêza xwe ve jî bête biparastin. Ger ku Kurd Nevîyên Mîdîyan neyêtin biderketin, ma gelo çi bi serê vî Miletê Kevnarî Gernas ve hatîye bikevtin, Ma ji kû derê ev tora fireh ji Êlên Kurdan hatîye biderkevtin, yên ku ew bi Zimanekî Iranîyî Yekkirî ve û cuda ji Zimanên Iranîyî din pê didin biaxivtin?

Bi Zimanê Rusî ve:

1. Agehdarîyên ku ew ji bal Şrwîrdarr Şahbenderxana Giştî de li Tebrîzê de Mîrza Minoriskî di pêla çûna xwe de ji bona Meraxe û herema Çemê Cext û Tataw di prşîya tebaxa sala 1906 hatîye bicivandin, "Nûçeyên Rêberîya herema Qefqasîyî cengînî" 1907, siyemê duwemîn, Jm. 20, R. 34-55.

2. Raportek li ser çûna Şêwirdarê Şahbenderîya Giştî de li Ezirbêcanê Minoriskî ji bona herema Mako di çirya pêşî de ji sala 1905 de, "Metiryalên li ser Xwendekarîya Rojhilat", Belavoka yekem, R.1-62 ligel Neqşekê de.

3. Ehl-Elheq yanjî "Alî Xwedanî" Pêşgotinek, metnên Wergerandî, Mosko 1911.

4. Agehdarî li ser xelkên hinek ji heremên sînorên Turkî-Farisî de, "Metiryalên li ser Xwendekarîya rojhilat de" sala 1915 de, Belavoka duwem, R. 433 - 480.

5. Kurd, Rûnkirin û Dîtin, Pêtersburg 1915.

6. Gera Wênerê Rusî û yê Ingilîzî Mîrza Minoriskî û Sîplî di 8 pûşpere de û 16 êlûnê de ji

bona heremên Farîsîyî vegirtî ji bal Türkan de "metiryalên li ser xwendekarîya Rojhilat de", sala 1915 de, Belavoka Duwem, R. 1-132 ligel Neqşekê de.

7. Sînorên Turkî-Farîsî nîşakirî ji bal Wênerên Imperetorîya Rusî Minoriskî de di sala 1914 de, "Metiryalên ji bona Xwendekarîya Rojhilat", sala 1915 de, Belavoka Duwem, R. 219-432 ligel 6 Neqşan û 8 Wênan de.

8. Destnîşankirina Sînorên Tirkî-Farisî "Nûçeyên Civata Ciyografîyî Imperetorîya Rusî" 1916, Bergê 52, Belavoka Pêncem, R.315-432, ligel 8.

Lîstan, yek Neqiş lige l3 Lîstan û Wêneyekî bi tenha xwe ve.

9. Kevnarîya Mako, Rûnkirinên Gervanekî, Pêtersburg, 1916 de 29. Rûpel û 8. Neqiş.

10. Kêle Şîn û Kevintirîn Şopên Mêjîyî li nîzka gola Ormiyê de. "Belavokên Beşê Rojhilatî Civata Şopêyî Imperetorîya Rusî", 1916 de, Bergê 24, R. 145-193.

Bi Zimanê Ingilîzî

11. Pirsiyarîya Mûsilê "Navînîya

Pêragihandinan ji bona Pirsiyarîyên Cîhanî bi ser Nivîsxana Emerîkî ve li Parîsê", Nîsana sala 1926 de, 15, Jm. 9 û 10, R. 1-44 ligel du Neqşan de.

12. Rûnkirinên li ser Elîfe Baya kurdîyî Latînî de, "Kovara Civata Patîşahîyî Asyayî" Tîrmeha sala 1933 de, Beşê Siyem, R.643-650.

13. Raportek li ser Nivîsta "A. M. Hamilton, Gerek li Kurdistanê de, london 1937 de, Çapa

Yekem", "Belavoka Dibustana Rojhilatî û Xwendekarîyên Efrîqî", 1937 de, Bergê Nehem, Jm. Yekem.

14. Raportek li ser Nivîsta "T. R. Lîç de, Rêstikên Civakî û Abûrî li Rewanduza Kurdî de, London 1940", "Kovara Ciyografî", 1941, jm. nîsanê.

15. Goran "Belavoka Dibustana Rojhilatî û Xwendekarîyên Efrîqî", 1943, Bergê Yazdemîn, Beşê yekem, R.75-103 - Dr. Nacî Ebas ev gotara hanê ji bona Zimanê kurdî date biwergerandin, ji xwe re li kovara Gelawêjî Kurdî, Bexdad 1944, Jimarên 5-9 bide bitemaşekirin.

16. Êlên li Rojavayî Iranê de "Kovara Istityuta Intiropolocîyî Patîşahî", 1945, Bergê 77, Beşê yekem û Duwem, R. 73-80.

17. Raportê li ser Nivîsta A. Safrastiyan, kurd û Kurdistan, London 1948 de, Nivîstxana Rijhilat, Laydin, 1950, Jimara Duwem, R. 50- 51 .

18. Xwendekarîyên di Mêjûwa Qefqasya de, London 1953, R.9, 21, 32-37, 113-116, 124-146.

19. Navên Cihên bi Zimanê Mengolî ve li Kurdistana Mokriyanî de "Belavoka Dibustana Rojhilatî û Xwendekarîyên Efrîqî" 1975 de, Bergê Nozdehan de, Jimara Yekem de.

Bi Zimanê Firensî

20. Rûnkirinên li ser Rêça Ehl-Elheq de "Kovara Cîhana Musulmantîyê", 1920, Bergê 25-26, R. 19-97

21. Rûnkirinên li ser Rêça Ehl-Elheq de "Kovara Mêjûyî û Oldarîyê", 1928, Bergê 45, Jimara yekem, R. 90-105.

22. Nivîsteke kurdî "Kovara Xwendekarîyên Musulmantîyê", sala 1930, Bergê Çarem, Beşê yekem, R. 157-160.

23. Serbestîya Diyalime "Belavoka Civata Xwendekarîyên Iranî û Farisî" Pans, 1932, . Jimara Siyem, R. 26.

24. Li ser pêwendîyên Turkîyî Italî de di sedsalê panzdehan de "Belavoka Civata Xwendekarîyên Iranî û Farisî" Paris 1933, Jimara Heştem, R. 23.

25. Koka Kurdan, di nivîsta "Raportên Kongirê Cîhanîyî Bîstem de ji yê Rojhilatnasînê de di sala 1938 de" Biroksil 1940, R.143- 152.

26. Metnên Kurdîyî Kevin "Belavoka Navîna Xwendekarîyên Kurdî", Parîs 1950, Jimara Dehem, R. 8-10. Gotarên wî di "Insikilopêdya Musulmantîyê de".

27. Kurd. Kurdistan, Bergê Duwem, Çapa Firensî, R.1196- 1222, Çapa Ingilîzî, R. 1130¬1155, Çapa Elemanî, R. 1212- 1240.

28. Lek, Bergê Siyem, Çapa Firensî, R. 11-12, Çapa Ingilîzî, R. 10-11, Çapa Elemanî, R. 11-12.

29. Lor, Lorê Mezin û Lorê Biçûk, Çapa Firensî, R. 43-51, Çapa Ingilîzî, R. 41-50, Çapa Elemanî, R. 45-54.

**

QANÛNÊN HEMORABI

1

Berlin, di 9.01.2012 de, di demjimara 5 de

Ez vê nivîsta hanê ji bona yekekî ve ji gewretirîn Rewşenbîrên Kurdistanê re di vê serdema me de ji bona berêz Dr. Ismet Şerîf Vanlî ve –(21. 11. 1921 – 9- 11. 2011) -didim bidiyarîkirin. Em bi sedan ve ji xortên Kurdan ve li Ewropa de li ser destên wî de bi şêweyê xebatê ve ji bona

Serxwebûna Kurdistanê û pêkanîna dewletekî milî ve hatin bifêrkirin û biperwerdekirin. Kêm merovan weha bi zanistî ve li ser çarekirina pirsa Kurd de bi mîna Dr. Ismet Şerîf Vanlî ve bi rêkûpêk ve dane binivîsandin.

Dr. Mohamed Salih Cuma

2

Kurtîya jîna min di nava çend rêz û dêran de

Ez di 28 gulana1 sala 1937 de li gundê Kêstek de li Herema Cezîrê de li Kurdistana Surî de ji malbata Başokî Yezîdîyî Musulman ve hatime bizayîn; jiber ku fermana Bav û Kalên min li ser destên Selteneta Osmanî de der sedsalê nozdehan de li Şingalê de hate birakirin û bi darê zorê ve gumgume bi destên me ve dane bihilgirtin2.

Min xwendina xweyî dibustanî li bajarê Qamişlo û Şamê de ji sala 1946 tanî sala 1959 de di nava dibustanên Suryanî de date bidawîkirin.

Di pêşî de di payîza sala 1959 de min li bajarê Şamê zanistgeha wê de di berê felsefê de date bixwendin.

Di pişt re di buhara sala 1960 li Elmanya Fêderalî de li bajarê Monîxê de di zanistgeha wê de di berê zanistîyên dewletê de tanî sala 1964 date bixwendin.

Di payîza sala 19643 bi saya Partîya Demokrati Kurdistan ve xwendin li Elmanya Demokratî de bi destên min û neh Hevalên dinî Partî ve hate bikevtin û min li Berlina Rojhilat de di Kolêca Abûrî de abûrîya siyasî date bixwendin.

Di tîrmeha sala 1967 de min têde Diplom di zanistîya mêjûwa abûrîyî siyasî de date biwergirtin û herwehajî têde di reşmeha sala 1972 de min nama Doktora di zanistîya mêjûwa abûrîya siyasî de date biwergirtin.

Ji sala 1975 – 1975 de min di warê wegerandinê de didate bikarkirin.

Ji sala 1975 tanî sala 1992 ve min li zanistgeha Hombold de li bajarê Berlin de di berê mêjûwa abûriya siyasî de bi giştî ve û di mêjûwa abûrîya siyasîya Dewletên Paşkevtî de bi taybetî ve didate bikarkirin.

Ji sala 1953 de min xwe bi zimanê meyî Şêrîn û perest ve didate bimijûlkirin û wî û herwehajî mêjûwa me tevaya bala min bi ser xwe ve didatin birkişandin. Bi xewna zarotîya min ve dihate biderkevtin, ku ez di warê wî û herwehajî mêjûwa me de bidim bikarkirin û wan bidim bipêşvexistin, da ku miletê Kurd ji sedsalên navînî û bendîtîyê ve bête birizgarîkirin û bi serxwebûnê ve di nava Kurdistanê de bête bitackirin; jibervejî ve ez ji bona xendekarîyê ve ji bona Ewropa ve hatim biçûyîn.

Cîhanbînîya min di têgihiştina diyalêktîka jîne de li ser felsefa Zerdeştî, Aristo, Xanî, Hegel û Marx de tête bibingehkirin û pêkanîna Dewleteke Milîyî Serbixwe ve di nava Kurdistanê de li ser Rêbazê Barzanî û felsefa Xanî de tête bicî û biwarkirin.

Ji sala 1953 de û hêjî ez bi Endamê Partî ve têtim biderkevtin û her u her ez bi jêhatî ve di nava rêzên wê de bi mîna Endamekî ve didim bikarkirin.

1 Di piştî lêgerandineke dirêj de li ser gotina Dêya min de ji bona mêjûwa zayîna min ve 28 gulana sala 1937 hate biderkevtin. Min û herwehajî piranîya Hevalên meyî din li Ewropa de 21 avadarê roja cejna Newrozê bi roja zayîna xwe ve didatin bitumarkirin.

2 Der sala 1831 de li ser destên Mohamedê Pasayê Kor, Paşayê Rewanduzê de li çiyayê Şingalê de fermana Yezîdiyan hate birabûn. Kalikê me Evdal ligel Xweha xwe de bi darêzorê ve, ji tirsa mirinê ve hatin bimusulmankirin.

Min buhuşta xwe ji bona Eto –Osamn- Zêbarî ve bi sê sebetê hinarê Nazenîn û Hêranê ve û min dujeha xwe bi yek kilo benîyê Çiyayê

Omerîyan ve ji bona Mustefayê Mohamedê Sulêmanê Cezîrî ve dayîte bifirotin.

Di piştî kirîna buhuşta min re Eto bi kêf û dildarî ve ji bona Berêz Serok Mesud Barzanî ve kirîna behuşta min pê date bigihandin. Berêz Mesud jê date bibipiskirin, te bi çend ve buhuşt jê dayîte bikirin. Wî date bigotin: min ew bi sêsetê hinaran ve dayîte bikirin. Berêz Mesud lê date bivegerandin, bi zîyana te ve ev hatîye biderkevtin. Weha Eto ev giftûgoya hanê ji min re date bigotin. Min jî lê date bivegerandin: Belê, Berêz Mesud Barzanî bi rast ve dide bigotin; jiber ku heger buhuşta min heba, min ew nedidate bifirotin. Wetov min xwe ji Buhuşt û Dujeha Musulmantîyê ve bi xişkayî û xweşkayî ve date birizgarîkirin.

3 Di hemû belgeyên dinî nivîsandî de di nivîstên min de bi şaşî ve sala 1963 hatîye binivîsandin. Di piştî çapkirina wan nivîstan de ew şaşbûna hanê hate bidiyarkirin; jibervêjî ve ez dixwazim hêvîya lêbuhuranê bidim bikirin û vê şaşbûna hanê jî li vêderê de bidim birastkirin.

3

Ji sala 1960 tanî 1987 de min di nava rêzên Komela Xwendevanên Kurd li Ewrop de bi jehatîbûn ve didate bikarkirin û di 22 reşmeha sala 1960 li bajarê Planing de li nêzîkî Monixê de li Elmanya Fêderalî de min beşdarî di Civîna Pêkanîna Rêxistina Partî Demokratî Kurdistan li Ewropa date bikirin û jî wê rojê de tanî neha ez di nava rêzên wê partîyê de didim bikarkirin.

Di nava salên 1979 tanî sala 1993 de bi Endamê Komitîya Nawendî û Endamê Mekteba Siyasî ve dihatim biderkevtin

Ji sala 1996 de ez bi Nîşana Barzanî ve hatim bixelatkirin û herwehajî bi Rawêjkarê Siyasî ve ji bona Mesud Barzanî hatin bidestnîşankirin.

4

Pêşgotina werger

Yek ji bi navûdengtirîn Padîşahê Babil ve bi navê Hemorabî (1793-1750 B.Z.) ve dihate binavkirin. Berî 1800 salê di berî zayînê de Babil bi bajarê mezintîrin û pêşkevtirîn ve di seranserî dunyayê de dihate biderkevtin.

Destûra Padîşahê Hemorabî li ser kêleke sengînî mezin de hatibû binivîsandin, ji ya ku ew bi kevintrîn û baştirîn qanûnên merovanyê ve di serdema xwe de dihate biderkevtin û ew di gorepana bajêr de hatibû bidanîn, da ku hemû milet wê bide bixwendin, bidîtin û pê bide bikarkirin.

Berî nêzîka 1170 salî di berî zayînê de, di cengekekê de Êlamîyan dikarîbûn Babil bidin bişekenandin û bivegirtin, kêla Hemorabî ligel talandîyên din de ji bona Şuş ve bi xwe re bidin bianîn.

Dozandina nivistên Qanûnnên Padîşah mezinî Hemorîbi bi saya kolandinên Firensiyan ve tête biderkevtin, ji yên ku wan ew di zivistana 1901/02 li ser xakê bajarê Şûşa – Suza- Paytextê kevnarî Êlamî de ji bal Jack Morgan ve didatin bikirin. Mexabin ku Firensîyan ev kêla hanê ji bona Mozexana Lovrê ve li Paris de dane birevandin. Daneyekî jibergortîyî jê ve ew li Mozexana Pêrgamon de li bajarê Berlin de tête bidîtin.

Bendên Qanûnên Hamorabi di çilûçar xanan de hatine birêkûpêkkirin. Ew bi zimanê Babilî ve bi şêweyê qanûnên Lêbt Eştar ve, bi nivîsandina mêxî ve hatine binivîsandin. Ew bi 282 bendan ve têtin biderkevtin, bi pirbûn ve ew bi bêtir ji 300 bendan ve dihatin biderkevtin. Padîsahê Elamî jimarek ji rêzan ve jê date bihilanîn, da ku ew li şûna wan de navê xwe û karê mezinî vekirina xweyî Babil li ser de bide binivîsandin.

Qanûnên Hemorabî ji bona 15 beşan ve têtin biparvekirin:

Beşê Yekem: ji bendên 1-5 ve bi Dadweran û Bînvanan ve têtin bigirêdan.

Beşê Duwem: ji bendên 6-25 ve bi dizîyê û talankirinê ve têtin bigirêdan.

Beşe Sêyem: ji bendên 26-41 ve bi karûbarên Laşker ve têtin bigirêdan.

Beşê çarem: ji bendên 42-100 ve bi karûbarên zevî, bax û malê ve têtin bigirêdan.

Beşê Pêncem: ji bendên 101-107 ve bi enbarên kirîna giştî, dukanên bazirganan, girawkirinê û danûsitendinê ve ligel bazirganên biçûk ve têtin bigirêdan.

Beşê şeşem: ji bendên 108-111 ve bi meyxanan ve têtin bigirêdan.

Beşê Hevtem: ji bendên 112-126 ve bi firoştinê ve têtin bigirêdan.

Beşê heştem: ji bendên 127-195 ve li ser karûbarên malê, mafeyên wê û pêwendiyên neferên wê de ligel hevdû de têtin bigirêdan.

Beşê Nehem: ji 196-227 ve li ser sizadanên jidêlvedanê de, li ser sizadanên nayînîkirina lihevkiranan, peymanan, û peymangirêdanan de têtin bigirêdan.

Beşê Dehem: ji 228-240 ve li ser buhabûnan, danîna kirya avakirina xanîyan, qeyikan û hêjabûna wan de têtin bigirêdan.

Beşê yanzdehemîn: ji 241-277 ve bi kirya merov û cenaweran ve têtin bigirêdan.

Beşê duwanzdehemîn: ji bendên 228-282 ve bi nîşamkirin sînorên bendan ve, bi mafe û erkên wan ve têtin bigirêdan4.

Min ev Qanûnên hanê ji bona zimanê meyî şêrîn û perest ve dane biwergerandin, da ku kurd jî bi zemanê xwe ve van qanûnên giring, giran û hêja di mêjûwa merovanyê de bidin ji xwe re bixwedin û biliberkevtin.

Ez li vir de sipayasîya xwe ji bona Fewzî Asad ve didim bipêşkeşkirin, jiber ku wî ev û herwehajî hemû nivîsandinên minî din dane birastkirin. Herwehajî ez sipasîya Dr, Ciwan Cuma didim bikirin, jiber ku wî ev û hemû nivîsandinên minî din jî ji alîyê teknîkî ve dane biamadekirin.

4 Bi zimanê Erebî ve: Şerîet Hemorabi, Werger Mehmûd El-Emîn. Alwarrak Publishing Ltd, London 2007, S. 11, 12.

5

Mi ev nivîsta hanê li ser bingehê nivîsta Elmanî de: Codex Hammurabi, Wilhelm Eilers, Marixverlag, Wiesbaden 2009 dayîte biwergerandin. Herwehajî min ji nivîstên Erebî, Ingilizî û Farisî ve sûd ji xwe re dayîte biwergirtin. Ez ji dil û can ve ji Xwedevanan û Rexnevanan ve li ser şaşbûnan de hêvîya lêbuhurandinê didim bikirin.

Min tanî niha ev nivîstên hanê bi zimanê meyî şêrîn û perest ve dane binivîsandin û biçapkirin yanjî bisêlikkirin:

Barzanî û Tevgera Azadîya Kurd

1931 – 1958.

Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de

Barzanî û Tevgera Azadîya Kurd

1958 – 1961

Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de

Kurtîya Mêjûwa Kurd û Kurdistanê

ji Despêkirina Mêjûwê Tanî vê Rojê

Mohamed Emîn Zekî Beg

Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de

Mêjûwa Dewlet Û Mîrneşînîyên Kurd Di Pêla Musulmantîyê De

- Bergê Duwem ji Kurtîya Mêjûwa Kurd Û Kurdistanê

Mohamed Emîn Zekî Beg

Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de

Pirsiyarîya Kurd

Mêjûwa Kurdan û Niha Wan

(Civata Xweyîbûnî Kurdîyî Welatperwer)

Dr. Bilêc Şêrkoh

Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de

Kurd

Rûnkirin û Dîtin

Kurd Nevîyên Mîdîyan

V. F. Mînoriskî, Hewlêr

Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de

Kurdistana Turkî di Navbera Herdu Cengan de

Profisor A. Hasretyan

Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de

Der Sitratîcîya Siyasîyî û sipahîya

Tevgera Welatîyî Kurd

-Temaşekirinek ji bona Mêj û Niha, herwehajî yekeke din ji bona Ayinde jî de

Dr. Ismet Şerîf Wanlî

Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de

Zanistîya Mêjûwê li Ewropa de, Felsefa wê, Şêweyê wê, Pêşkevtina wêna, 6

Rûnkirinên li ser Mêjûwa Kurdistanê û Dîroknivîsandina Rojhilatî de

Dr, Ismet Şerîf Wanlî

Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de

Tevgera Kurd di serdema nuh û niha de

Akadimîya Zanistîya Yekitîya Sovyêtê û Akadimîya Zanistîya Erminiya Sovyêtê, di sala 1987 de

Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de

Mîr

Nikolo Mikavili

Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de

Peymana Civakî

Jean Jacques Rousseau

Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de

Pêşkevtina Sosyalistîyê ji Otopîyê tanî Zanistîyê

Friedrich Engels

Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de

Rola Kar di Veguhertina Meymûnan de ji bona Merov

Firiedrich Engels

Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de

Manîfêsta Patîya Komonist

Marx, Engels, Di Weşanên Romahî de Elmanya û di

Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan, sala 1999 de

Derbarê Mafeyê Netewan di Nîşankirina Çarenûsa xwe de

Lenin

Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de

Şê kanî û Sê Pêkhatinên Markisistîyê

Lenîn

Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de

Zîneta Zimanî di nava Heremên Kurdî de

R. L. Tissabolov

Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de

Li ser rêya Azadîya Kurdistanê de

-Çendbîr û bawerî li ser hin rûdanê siyasîyî de ji sala 1956 – 1975 de-

Dr. M. S. Cuma

Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, Kurdistan. Di sala 1999 de

Li ser Tirba Şêro de

Dr. M.S. Cuma, Berlin, di sala 1966 de

7

Sî sal li ser Mêjûwa Komela Xwedevanên Kurd li Ewropa de

Dr. M. S. Cuma, Berlin, di gelawêja sala 1986 de

Şerefname

Şeref Xanê Bedlîsî, Dihok, sala 2006

Wêşanxaneya Spîrêz

Çapxana Wezareta Perwerdeyê, Hewlêr, di sala 2006

Evsane

Thomas More

Çapxan Xanî – dihok

Wêşanxaneya Spîrêz, sala 2008

HEGEL

Peyvdarîyên li ser Mêjûwa Felsefê de, li ser Sêlikê de, sala 2011

Bergê I

Qanûnên Hemorabî, li ser Sêlkê de, sala 2012

Berlin, di 08. 03. 12 de. Dr. M. S. Cuma.

8

Qanûnên Hemorabî

Benda 1

Heger ku Merovekî Azad Merovekî dinî Azad date bigunehdarîkirin5 û wî ew bi kuştinê ve date bigunehbarîkirin, lêbelê ew li wî de wê nikare bide bicihkirin, dê Tawanbar bête bikuştin.

Benda 2

Heger ku Merovekî Azad Merovekî dinî Azad bi canbazîyê ve bide bigunehdarîkirin, lêbelê ew nikare wê bide bicihkirin, divê Sucdar ber bi çem ve bête biçûyîn û ew divê xwe ji bona nava çem ve bide biavêtin, heger ku çem zora wî bir, dê Sucdarê wî destên xwe ji bona paşmayên wî ve bide bidanîn, Heger ku çem date bixuyanîkirin, ku ev Merovê Azad bi bêguneh ve tête biderkevtin û ew bi saxî ve hate biderkevtin, Sucdarê wî bi canbaziyê ve divê bête bikuştin, ji yê ku wî xwe ji bona nava çem ve dabû biavêtin, divê ew destên xwe ji bona ser paşmayên Suçdarê xwe ve bide badanîn.

Benda 3

Heger ku Merovekî Azad Goveke6 derew di dozekî de bide bikirin û ew nikare rastîya gotinên xwyî gotî bide bicihkirin, heger ku ew bi doza jîyanê ve bête biderkevtin, divê ew Merovê Azad bête bikuştin.

Benda 4

Heger ku wî bi goveke derew ve derbarê dozeke bajartî ve date bikirin, divê ew siza wê dozê bide bihilgirtin.

Benda 5

Heger ku Dadvanekî ferman date bidan, biryarek date biderxistin, wî ew bi nivîsandî ve date bicihkirin, û wî fermana xwe date biveguhertin, di pişt re divên ew bidin bicihkirin, ku wî Dadvanî fermana xwe dayîte biveguhertin, ji ya ku ew dabû biderxistin, divê ew bi diwanzdeh carî ve bi nala wê dozê ve bide bidan, ji ya ku ew di wê dozê de hatibû bihildan, hêjîbêtir, divên ew wî li ber Xelkê de ji ser kursîya Dadwerîtîyê ve bidin biavêtin û ew divê careke din ne bête bivegerandin û nejî li ser kursîya xwe de ligel Dadvanan de di dozekê de bête birûniştin.

Benda 6

Heger ku Merovekî Azad mal7 ji Mala Xwedê ve yanjî ji Xanîkî ve date bidizîkirin, divê ew bête bikuştin, herwehajî ji yê ku malê diziyê ji wî ve dabû biwergirtin, divê ew jî bête bikuştin.

Benda 7

Heger ku Merovekî Azad date bikirîn yanjî bi rengê sipartinê ve Zîv, Zêr, Bendekî Nêr yanjî Bedeke Mê, Gayek, Kerek, Pezek yanjî çiyê din ji destên Kurê Merovekî Azad yanjî ji destên Kurekî Bende ve bi bê Bînavan ve û bi bê girêdana Peymanan ve date biwergirtin, dê ew Merovê Azad bi diz ve bête bidanîn û divê ew bête bikuştin.

Benda 8

Heger ku Merovekî Azad Gayekî, Pezekî, Kerekî, Berazekî, Qeyikekê bide bidizîn, ji yên ku ew bi malên Mala Xwedê ve yanjî ji bi Kaxê8 ve têtin biderkevtin, divê ew bi sî cari ve bi

5 Bezichtigen: Accused: Gunehbanîkirin, Suçdarîkirin. Navbidûxistin

6 Zeuge: Witness: Govan, Bînvan.

7Waren, Güter: Goods: Mal, Berkirin.

9

beramber ve bide bidan, heger ku ew ji bona Perîşanekî ve bêtin biderkevtin, divê ew bi deh cari ve bi beramber ve bide bivegerandin. Heger ku Diz nikaribe bide bivegerandin, divê ew bête bikuştin.

Benda 9

Heger ku Merovekî Azad beşek ji malê xwe ve date biwindakirin û wî hinek jê li nik Merovekî dinî de azad date bidîtin. Merovê Azad, ji yê ku mal li nik wî de dihate bidîtin, date bigotin: „Merovekî mal ji bona min ve date bifirotin. Min ew bi amadebûna Bînvanan ve dayîte bikirîn“; û heger ku Xwedîyê malê windakirî jî ji alîyê xwe ve Bînvanên piştgirtina malê xwe dane bianîn, divê Dadwer li gotinên wan de bide bitemasekirin. Li ser Bînvanên dîtina kirinê de û li ser Bînvanên naskirina malê windabûyî de divên li ber Xwedan de tiştên dizanin bidin bigokirin. Firoştvanê9 wisa bi Diz ve tête biderkevtin û divê ew bête bikuştin. Xwedîyê malê windakirî divê malê xweyî windakirî bide biwergirtin. Kirîdar10 jî divê zîvên xwe ji sermiyanê malê Firoştvan ve bide biwergirtin.

Benda 10

Heger ku Kirîdar ji alîyê xwe ve ne Firoştvan û nejî Bînvanên di dema kirînê de nede bianîn, lêbelê Xwedîyê malê windakirî ji alîyê xwe ve Bînvanan bide bianîn, ji yên ku wan ew malê hanê bi nala malê wî ve dane binaskirin, vêca Kirîdar bi Diz ve tête biderkevtin; divê ew bête bikuştin. Xwedîyê malê windakirî divê malê xweyî windakirî bide biwergirtin.

Benda 11

Ji alîyekî din ve, heger ku dozdarê Xwedîyê malê windakirî Bînvanan nede bianin, ji yên ku ew malê wîyî windakirî didin binaskirin, ew bi sextebazîyê ve tête bitawanbarîkirin û ew bi gilîkî derew ve pê hatîye birabûn, ew divê bête bikuştin.

Benda 12

Heger ku Firoştvan di wê demê de hatibe bimirin, dê Kirîdar ji sermiyanê Firoştdar ve pênc beramber ji daxwaza doza kirî ve bide biwergirtin.

Benda 13

Heger ku Bînvanên wî Merov Azad ne li berdestan ve bêtin biderkevtin, divê Dadvan jê re demekê di navav şeş mehan de bide bidanîn, û heger wî di nava şeş mehan de Bînvan nedane bianîn, ew Merovê Azad bi derwkar ve tête biderkevtin; ew divê sizadana wê dozê bide bihilgirtin.

Benda 14

Heger Merovekî Azad Kurekî Biçûkî Merovekî Azadî din date bidizîkirin, divê ew bête bikuştin.

Benda 15

Heger ku Merovekî Azad alîkarîya Bendeyekî Nêr yanjî Bendeyeke mêyî Dewletê yanjî Bendeyekî Nêr yanjî Bendeyeke mêyî Merovekî sade bi bazdanê ve ji bajêr ve date bikirin, divê ew bête bikuştin.

8 Palast: Palace: Kax, Qesir.

9 Verkäufer: Seller: Firoştvan, Firoştdar.

10 Käufer:: Buyer: Kirîvan, Kirîdar.

10

Benda 16

Heger Merovekî Azad di nava mala xwe de Bendeyekî Nêr yanjî Bendeyeke Mêyî Dewletê yanjî Merovekî sade date biveşartin û wî ew ne ji bona bingeha Polîs ve date bisipartin, divê ew Xwedîyê malê bête bikuştin.

Benda 17

Heger Merovekî Azad Bendeyekî Nêr yanjî Bendeyeke Mê li çolê de date bigirtin û wî ew ji bona Xwedîyê wan ve date bivegerandin, Xwedîyê wan Bendan divê ji bona wîna ve du Şikilên11 Zîv bide bidan.

Benda 18

Heger ku Bendeyekî wisa naxwaze navê Xwedîyê xwe bide bigotin, divê Girtîvanê wî wîna ji bona Kaxê ve bide vibirin, da ku nasnama wîna bête binaskirin û divê ew wî ji bona Xwedîyê wîna ve bidin bivegerandin.

Benda 19

Heger ku Girtîvan ew Bendê hanê di mala xwe de date bivêşartin û di pişt re ew Bendê hanê li nik wî de hate bigirtin, divê ew bête bikuştin.

Benda 20

Heger ku Bende ji nava destên Girtîvanê xwe ve date bibazdan, divê li ser wî Merovê Azad de ji bona Xwedîyê Bende ve bi Xwedan ve bide bisûndxwarin û divê ew ji xwestiyê ve bête biazadkirin

Benda 21

Heger ku Merovekî Azad di rêya kunekê de ji bona nava Xanîyekî de dixwaze bête bikevtin, weha Merov wî ji bona vê kuna hanê ve dide bikuştin û wî ji bona nava wê kuna hanê ve dide biveşartin

Benda 22

Heger ku Merovekî Azad bi dîzîyê ve dihate birabûn û ew hate bigirtin, divê ew Merovê hanê bête bikuştin.

Benda 23

Heger ku Diz nehate bigirtin, divê li ser Merovê Azadî jê dizîkirî de li nik Xwedan de li ser hemû tiştên xweyî dizî û windakirî de bide bigilîkirin û divê li ser bajêr û Serdar de, ji yên ku di nava erdê wan de û di herema wan de dizitî hatîyê bikirin, tevaya dizîtîyê jêre bidin bivegerandin.

Benda 24

Heger ku Kesekî di dema dizîyê de jîna xwe date biwindakirin, divê li ser bajêr û Serdar de ji bona Merevên wîna ve Minek Zîv bidin bidan.

Benda 25

Heger ku agir bi xanîya Merovekî Zad ve hate bikevtin û Merovekî Azadî din, ji yê ku ew ji bona vemirindinê ve hatîbî biçûyîn, çavên xwe ji bona ser malê livandîyî Xwedîyê Xanî ve dabû biberdan û wî malê xwedîyê wê date bibirin, divê ew ji bona nava wî agirê hanê ve bi xwe ve bête biavêtin.

11 Şikil bi giranbûna 8 Giraman ve tête biderkevtin

11

Benda 26

Heger ku ji Serbazek yanjî Nêçîrvanekî Tora Masîyan ve ji bona karê12 perabûna çekdarîyî Padîşah ve hate bixwestin, ew nehate biçûyîn, yanjî wî Merovekî din ji dêlva xwe ve date bikirêkirin û wî ew ji dilva xwe ve date birêkirin, weha dê ev Serbaz yanjî Nîçîrvanê Tora Masîyan bête bikuştin; ji yê ku ew ji bal wî ve hatibû bikirêhkirin, dê Xanîyê wî jî bide biwergirtin.

Benda 27

Heger ku Serbazek yanjî Nêçîrvanekî Tora Masîyan ji bona karê pêrabûna çekdarîyî Padîşah ve hate bifermandarîkirin û di dema mayîna dûrbûna

wîna de zevîyê wî yanjî Baxê13 wî ji bona yekekî din ve dabûn bidan û ev bi erkên xweyî derebegîyê ve dihate birabûn û heger ku ewê hanê hate bivezîvirandin û ew bi bajarê xwe ve hate bigihandin, weha divê merov ji bona wîna ve zevîyî wî yanjî Baxê wî bide bivezîvirandin, û ew divê bi erkên xwe ve bête birabûn.

Benda 28

Heger ku Serbazek yanjî Nêçîrvanekî Tora Masîyan di dema karê perabûna çekdarîyî Padîsah de hate bidîlvekirin û Kurê wî dikare bi erkên derebegîyê ve bête birabûn, weha divê jêre zevî û Bax bête bidan û divê li ser wî de ew bi erkên Bavê xweyî derebegîyê ve pê bête birabûn.

Benda 29

Heger ku Kurê wî hêjî bi Sava ve bête biderkevtin û ew nikaribe bi erkên Bavê xweyî derebegîyê ve pê bête birabûn, webha divê yek ji sêsyan ve ji zevî ve yanjî ji Bax ve ji bona Dêya wîna ve bête bidan, da ku ew bi xwedîkirina wîna ve bête birabûn.

Benda 30

Heger ku Serbazek, yanjî Nêçîrvanekî Tora Masîyan dev ji zevîyê xwe, Baxê xwe û xanîyê xwe ve jiber erkên derebegîyê ve date biberdan û wî xwe date bidûrkirin, yekekî din di piştî dûrxistina wîna de zevîyê wî, Baxê wî û xanîyê wî bi destên xwe ve date bixistin û ew bi dirêjbûna sê salan ve bi erkên xweyî derebegîyê ve pê hatîye birabûn, weha dê bête bikirin, heger ku ew bête bivezîvirandin û ew zevîyê xwe, Baxê xwe û xanîyê xwe bide bidawazîkirin, ew dê ji bona wîna ve neyêtin bidan. (lêbelê) dê ew ji bona yê ku destên xwe ji bona wan ve dabû biserdanîn, û ji yê ku ew bi erkên xweyî derebegîyî ve pê dihate birabûn, dê ew hêjîbêtir bi erkên xweyî derebegîyê pê bête birabûn.

Benda 31

Heger ku ew bes û bi tenha ve bi dirêjîya salekê ve hate bidûrkevtin û ew hate bivezîvîrandin, weha dê ji bona wîna ve zevîyê wî, Baxê wî û xanîyê wî jê re bête bivezivirandin, û ew divê bi xwe ve careke din bi erkên xweyî derebegîyê pê bête birabûn.

Benda 32

Heger ku Serbazek yanjî Nêçîrvanekî Tora Masîyan di dema pêrabûna Çekdarîya Padîşah de bête bidîlkevtin û Bazirganekî ew ji bona azadîkirinê ve date bikirin, û ew ji bona bajarê wîna ve date bivezîvîrandin; heger ku ew bi têrbûna xwedanê mal ve ji bona kirîna azadîya xwe ve bête biderkevtin, divê ew xwe bide bikirîn, heger ku ew bi xwedanê tu tiştekî ve di mala xwe de nayête biderkevtin, ji yê ku ew pê azadîya xwe bide bikirîn, dê ew ji bal Mala Xwedanê Bajarê xwe ve bi zadîyê ve bête bikirîna; heger ku tu tişt di Mala Xwedan de neyête bidîtin, ji

12 Zins: Intrest, Kar, Qazanc

13 Baugarten: Garden: Bax, Zevî, Çem, Werz, Rez, Mixtî..

12

yê ku ew xwe ji bona Azadyê ve pê bide bikirin, divê li ser Kaxê14 de azadîkirina wîna bide bikirîn. Zevîyê wî, Baxê wî, Xanîyê wî divê ji bona azadîkirina wîna ve neyête bidan.

Benda 33

Heger ku Serdarekî yanjî Serokekî date bikarkirin yanjî pêhate birûniştin, ku Serbazek ji pêrabûna çekdarîyî Padîşah ve bête bidûrxistin û kirêdarekî din ji dêlva wîna ve ji bon pêrabûna çekdarîya Padîsah ve date binardin, weha dê ev Serdarê hanê yanjî ev Serokê hanê bête bikuştin.

Benda 34

Heger ku Serdarekî yanjî Serokekî malê livandîyî Serbazekî date bibirin, date bitalankirin, yanjî ew ji bona Serbazekî ve jiber kirya wî ve pê date bidan, ji bona şerbazekî ve di rêya gilîyekî de ji yekekî xurt ve date bidan yanî di rêya talankirina Serbazekî de ji diyarîya Padîşah ve date bikirin, ji yê kû Padşiha ew pê dabû bixelatkirin, weha dê ev Serdarê hanê yanjî ev Serokê hanê bête bikuşin.

Benda 35

Heger ku Merovekê Azad ji destên Serbazekî ve dewarên reş yanjî pez date bikirîn, ji yên ku Padîşah ji bona Serbsaz ve dabûn bidan, wê dê ew perên xwe bide biwindakirin.

Benda 36

Zevî, Bax û Xanîyê Serbazekî yanjî Nêçîrvanekî Tora Masîyan yanjî Karmendekî din bi peran ve nikare bête bifirotin.

Benda 37

Heger ku Merovekî Azad Zevîkî, Baxekî yanjî Xanîyekî Serbazekî, Nêçîrvanekî Tora Masîyan yanjî Karmendekî din date bikirîn, weha divê Qafikê Peymana wîna bête bişikenandin, bi serdejî ve ew perên xwe dide biwindakirin; Zevî, Bax yanjî Xanî careke din ji bona Xwedîyê xwe ve tête bivegerandin.

Benda 38

Serbazek, Nêçîrvanekî Tora Masîyan yanjî her Karmendekî din nikare ji Zevî, Bax yanjî ji Xanî ve, ji yê ku jêre hatîye bidan, ji bona Pîreke xwe ve yanjî Keça xwe ve bide bidan, wehajî ew nikare ji wan ve bi biramberî deydarîyekê ve bête bidakevtin.

Benda 39

Ji Zevî, Bax yanjî Xanî ve, ji yê ku wî di rêya kirîne de bi destên xwe ve dayîte bixistin, ew dikare ji bona Pîreka xwe ve yanjî ji bona Keça xwe ve hinekî bide bidan, wehajî ew dikare hinekî jê bi beramberî deynên xwe ve bête bidakevtin.

Benda 40

Ew dikare Zevî, Bax, û Xanî ji bona Baziganekî ve yanjî ji bona her yekekî dinî Mîrîyî Gştî ve bide bifiroştin, divê li ser Kirîdar ve ku ew bi erkên xweyî Derebegîyê ve bi beramberî Zevî, Bax û Xanî ve pê bête birabûn.

Benda 41

Heger ku Merovekî Azad Zevîyekî, Baxekî yanjî Xanîyekî ji malê Serbazekî, Nêçîrvanekî Tora Masîyan ve yanjî ji her Karemendekî din ve date biveguhertin, wehajî wî buhayî wî dabû

14 Palast: Palace. Court: Kax. Qesir.

13

bidan, weha ji bona Serbaz, Nêçîrvanê Tora Masîyan ve yanjî ji bona Karmend ve Zeveyê wî, Baxê wî yanjî Xanîyê wî tête bivezîvirandin; wehajî divê buhayê jêre pêşkeşîkirî bête bihiştin, ji yê ku ew jêre hatibû bidan.

Benda 42

Heger ku Merovekî Azad Zevîyek ji bona çandinyê ve date bikirêkirin û wî ji Zevî ve dexilûdan15 nedate bilanîn, weha Merov jêre dide bicihkirin, ku wî Zevî nedayîte biajotin, weha divê li ser wî de ew ji bona Xwedîyê Zevî ve dexilûdan li gora Zevîyê Merovê Azadî teniştê de bide bidan.

Benda 43

Heger ku ew zevî nede biçandin û wî ew bi beyar ve date bihiştin, weha divê ew ji bona Xwedîyê Zevî ve dexilûdan li gora Xwedîyê zevîyê tenişta

wî de pê bide bidan; lêbelê heger ku zevîyê neçandî jiber xwe ve hate bişînbûn, weha divê ew berê wî bide bipaleyekirin, bide bidêran û wî ji bona Xwedîyê Zevî ve bide bidan,

Benda 44

Heger ku Merovekî Azad Zevîyekî Beyar ji bona çandinyê ve ji bona sê salan ve date bikirêhkirin; lebêlê ew hate bitembelîkirin û Zevî nedate biçandin û di sala çaran de Zevî jiber xwe ve hate bişînbûn, weha divê li ser wî de ew berê Zevî bide bipaleyîkirin û bide bidêran û wî ji bona Xwedîyê Zevî ve bide bidan; hêjî bêtir divê ew ji bona Xwedîyê Zevî ve deh Kur16 ji dexilûdan ve ji bona her heştdeh Ako bide bidan.

Benda 45

Heger ku Merovekî Azad Zevîyê Xwe ji bona Cotkaryekî ve bi beremberî pişkekê ve dabû bidan û wî pişka Zevîyê xwe date biwergirtin, di pişt re (Xwedan) Adad Zevî date bibinavkirin yanjî Lehîyekê Zevî date biwêrankirin, weha ji bona Cotkar ve Zîyan têtе bivegirandin.

Benda 46

Lêbelê, heger ku wî (hêjî) pişka Zevîyê xwe nedabe biwergirtin, lêbelê heger ku wî ew bi pîşkirina nîvê ve yanjî bi sêsîyekê ve dabû bikirêhkirin, weha divê li ser Cotkar û Xwedîyê Zevî de têtin biderkevtin, ku ew li gora berê çandinyê de bidin biparvekirin.

Benda 47

Heger ku Cotkar tu ber ji berê çandîya xweyî par ve nedate biwergirtin û ew ji çandînya zevî ve hate bibêzarkirin, weha Xwedîyê zevî tu kuspan nade bidurustkirin, ku Cotkar hêjîbêtir zevîyî wî bide bihilanîn û bidanîn, û di dema çinînê de ew li gora lihevhatîna di peymanê de para xwe ji dexilûdan ve bide bihilanîn.

Benda 48

Herger ku li ser Merovekî Azad de girawkirin bête bidîtin û Xwedan Adad zevîyê wî date bibinavkirin yanjî lehîkê çandinya wî li ber xwe de date bibirin, yanjî ji kêmanîya avê ve zevî tu berê dexilûdan nedate biavêtin, weha ew di vê sala hanê de tu dexilûdanî ji bona Deyndarê xwe ve nade bidan, ew Peymana Qafikê xwe dide binuhkirin û wehajî ew tu karê ji bona wê sala hanê ve nade bidan.

15 Getreide: Grain: Dexilûdan.

16 Kur = Huqe û ew ji bona 300 Qu tête biparvekirin. Eyko = 1/8 ji Fedan ve tête biderkevtin. (Li ser her 64 800 Mitrê Gargoşî divê ew 3000 (L) dexûda bide bidan. Cuma

14

Benda 49

Heger ku Merovekî Azad perê ji Bazirganekî ve date bi deynkirin û wî li nik Bazirgan de zevîkî şûvkirî ji bona çandinya dexilûdan yanjî kunciyan ve date bigirawkirin û heger ku wî jêre date bigotin: „Ji xwe re zevî bide biçandin û biçinîn û berê jêhatî ji dexilûdan û kuncîyan ve bide bikomkirin û bibirin“. Heger ku Çotkarê li ser Zevî de dexilûdan yanjî kuncî date bihilanîn, weha Xwedîyê Zevî di dema çininê de dexilûdan yanjî kuncîyan ji xwe re dide bihilanîn, ji yên ku ew li ser Zevî de hatibûn bişînhatin, û ew ji bona Bazirgan ve wî dexilûdanî û wan kuncîyan ji dêlva perên wî û kara wî ve dide bidan, ji yên ku wî ji Bazirgan ve dabûn bideynkirin û pêrejî wehajî ew xwerçîyên li ser çandinîyê de dide bidan.

Benda 50

Heger ku wî zevîyekî çandî bi dexilûdan ve yanjî zevîyeî çandî bi kuncîyan ve date bigirawkirin, weha Xwediyê Zevî dexilûdan yanjî kuncîyan dide

bibirin, ji yên ku ew ji Zevî ve hatibûn biberkirin, û divê li ser Xwedîyê Zevî de ew perên Bazirgan ligel kara wîna de bide bidan.

Benda 51

Heger ku ew bi xwedanê vegerandina peran ve neyête biderkevtin, weha divê ew ji bona Bazirgan ve dexilûdan yanjî kuncîyan li gora hêjabûna wan de di bazarê de yanjî li gora danîna hêjabûna wan de ji bal Padîsah ve ji dêlva perên wîyî qerzkirî ve ligel kara wan de bide bidan.

Benda 52

Heger ku Cotkarê bi kirêkirî ve li ser Zevî de tu dexilûdanî yanjî kuncîyan de ne de bihilanîn, weha ew nikare peymana xweyî lihevkirî de bide biveguhertin.

Benda 53

Heger ku Merovekî Azad derbarê xurtkirina derbendê xwe ve pir qelepbûn date bixuyanîkirin û derbendê xwe nedate bixurtkirin û di derbendê wî de vebûnek hate biderkevtin, ku jê lehîyekê avê hate biderkevtin, weha ew divê ji bona wî kesî ve dexilûdanê wêrankirî bide bidan, ji yê ku ew di rêya vebûna derbendê wîna ve hatibû birûdan.

Benda 54

Heger ku ew nikaribe dexilûdan bide bidan, weha divê merov wî û malên wî biramber bi peran ve bide bifiroştin û li ser Cotkaran de, ji yên ku dexilûdanên wan hatibûn biwêrankirin, wan peran di nava xwe de bidin biveparvekirin.

Benda 55

Heger ku Merovekî Azad cuhokên xwe ji bona avdanê ve bide bivekirin û di pist re pişta xwe bide bivekirin û weha ew Zevîyê tenişta xwe bide bibinavkirin, weha divê ku ew dexilûdanên wêrankirî ji bal binavikirinê ve

ji bona Xwedîyên wan ve li gora hatina perçê tenişta xwe ve bide bivezîvirandin.

Benda 56

Heger ku Merovekî Azad av date bivekirin û weha şînîyên zevîyî tenişta wî li ber avê de hatin bibirin, weha divê ew ji bona her 64 800 mitrê çargoşî ve 3000 L dexilûdan bide bidan (ku ew jê re deh Korê Dexilûdan ji bona her hêjdeh Êko ve bide bidan).

15

Benda 57

Heger ku Şivanekî bi bêlihevhatina Xwedîyê Zevîkî ve pezên xwe li ser şînaya Zevîyî wîna de datin biçêrandin û bi bêdestûra xwedeyî Zevî ve wî pezên xwe bi çêrandinê ve datin bihiştin, weha gava ku Xwedîyê Zevî Zevîyê xwe bide bipaleyîkirin, divê li ser Şivên de, ji yê ku wî ew dabû biçêradin, bi bêdestûra Xwedîyê Zevî ve ji bona Xwedîyê Zevî ve Bîst Koran ji dexilûdan ve ji bona Hêjdeh Akoyan bide bidan (ji bona 64 800 Mêtrê çargoşî ve 3000 Lîter dexilûdan bide bidan).

Benda 58

Heger Şivanekî di piştî ku pez ji mêrga çêrandina giştî ve hatibûn bikişandin û di piştî ku hemû pez ji bona nava dergehê Bajêr ve hatibûn bikevtin û dergah li wan de hatibû bidadan, ku wî pez ji bona nava Zevî ve date biajotin û Zevî ji bal pez ve hişt bête biçêrandin, weha Şivan Zevîyê, ji yê ku wî ew dabû biçêrandin, divabû ku ew pê bide biguhpêdan, divê li ser wî de di dema çinînê de ji bona Xwedî Zevî ve Şêst Koran ji dexilûdan ve li ser her Hêjdeh Akoyan de bide bidan (li ser 64 800 Mêtrê Çargoşî 18 000 L dexilûdan ji bona Xwedîyê Zevî ve bide bidan).

Benda 59

Heger ku Merovekî Azad darek ji Baxê Merovekî Azadî din ve bi bêdestûra Xwedîyê Bax ve date bijêkirin, weha divê ew Nîv Mine ji zîv ve bide bidan.

Benda 60

Heger ku Merovekî Azad Zevîk ji bona çandîkirinê ve date bidan, Baxvan Bax date biçandin, weha ew Bax bi dirêjbûna çar salan ve dide bixwedîkirin, di sala pêncan de Xwedîyê Bax û Baxvan bi mîna hev ve Bax li hevdû de didin biparvekirin; Xwedîyê Bax para xwe dide bihelbijarin û ew wî di pêşî de ji xwe re dide bibirin.

Benda 61

Heger ku Baxvan bi çandinya hemû Zevî ve nehate bidawîkirin û perçek jê wî bi beyar ve date bihiştin, weha merov beyarê bi ser behra wî ve dide biberdan.

Benda 62

Heger ku ew Baxê pê hatîye bidan, ew wî bi nala Bax ve bide bihilanîn û bidanin, lêbelê ew wî dide biçandin, weha divê li ser Baxvan de ji bona Xwedîyê Zevî ve berê jêhatina Zevî ji bona wan salan ve, ji yên ku ew di wan de bi beyar ve hatibû bihiştin, li gora jêhatina perçê tenişta xwe de bide bidan; pêrejî divê li ser wî de ew bi wan karên pêwist ve di Zevî de pê bête birabûn û divê ew Zevî ji bona Xwedîyî wîna ve bide bivegerandin.

Benda 63

Heger ku Bax bi beyar ve bête biderkevtin, weha divê ku ew bi karê pêwist ve di zevî de pê bête birabûn û ew wî ji bona Xwedîyê Zevî ve bide bivegerandin; bi serdejî ve divê ew li ser her 64 800 Mitrê çargoşî de 3000 L ji dexilûdan ve ji bona salekê ve bide bidan.

Benda 64

Heger ku Merovekî Azad Baxê xwe ji Baxvanekî ve ji bona hilanîn û danîna wîna ve date bidan, weha divê li ser Baxvan de ji bona Xwedîyê Bax ve Du ji Sêsyan ve ji jêhatina Bax ve bide bidan, bi dirêjbûna ku ew Bax di nava destên xwe de dide bihiştin, beşê Sêyêm ji jêhatina Bax ve ew ji xwe re dide bibirin.

Benda 65

16

Heger ku Baxvan bi Bax ve guhpê pê nede bidan û pêre jêhatina Bax hate bikêmkirin, weha divê Baxvan ji bona Xwedîyê Bax ve bi nala jêhatina Baxê teniştina xwe ve bide bidan…

„Valabûneke mezin bi xerakirî ve tête biderkevtin, ji ya ku ew ji Heft Sitûnanve di cihê wê de tête biderkevtin“.

Benda 66

Heger ku Merovekî Azad pere ji Bazirganekî ve date biqerzkirin û wî ji bona Bazirgan ve Baxekî ji darên Xurman ve date bidan û wî jêre date bigotin: „ ji xwe re Xurman ji Baxê min ve ji dêlva perên ve bide bihilanîn“, Belam Bazirgan bi vê ve pê nehate birûniştin, weha divê Xwedîyê Bax berên Xurmên hatî ji Bax ve bide biwergirtin û divê li ser wî de ew ji bona Bazirgan ve peran ligel kara wan de li gora peymana girêdayî li ser Qafik de bide bidan. Lêbelê bêtirbûna Xurmên, ji yên ku ew di Bax de hatibûn biberkirin, Xwedîyê Bax wan ji xwe re dide bihilanîn.

Benda 67

Heger ku Merovekî Azad ji xwe re Xanîyek date biavakirin û Teniştvanê wî….

(Bijar li ser Sitûnê de bi xerakirî ve tête biderkevtin).

Benda 68

(Bi xerakirî ve tête biderkevtin).

Benda 69

(Bi xerakirî ve tête biderkevtin).

Benda 70

(Bi xerakirî ve tête biderkevtin û jê bes û bi tenha ve ev hatîye bimayîn…-dîve ew bide bidan…).

Benda 71

Heger ku ew Dexilûdan, Zîv yanjî malekî din ji bona Xanîkî ve bi mebesta kirîna wîna ve dabe bidan, ji yê ku ew ji bona erdekî tenişta xwe ve bi girwakirî ve tête biderkevtin, weha dê ew hemû tiştên dayî bide biwundakirin û divê li ser wî de ku ew wî Xanîyî ji bona Xwedîyê wîna ve bide bivegerandin; lêbelê heger ku li ser wî Xanîyê hanê de tu girawkirin neyête bihilgirtin, weha ew dikare wî bide bikirîn; û ew ji bona vî Xanîyê hanê ve dikare dexilûdan, zîv yanjî malekî din bide bidan.

Benda (72 – 77)

(Ew bi xerakirî ve ji bil hin gotinên girêdayî ve bi avanîya Xanîyan ve têtin biderkevtin).

Benda 78

Ev Benda hanê di zevîyê Sêyem de ji sitûnê ve tête bikevtin û ew hatîye biziyankirin û ew wetov dikare bête bixwendin: (heger ku Merovekî Azad xanîyek ji bona Merovekî Azadî (din) ve date bikirêhkirin… Merovê Kirêhvan kirêh bi carekê ve ji boba sale(kê) ve ji bona Xwedîyê Xanî ve date bidan û (êtir) Xwedîyê Xanî ferman bi derkirina Kirêhdar ve ji Xênî ve bi berî bi dawîhatin demê ve date bidan, weha divê li ser Xwedîyê Xênî wan peran ji bona Kirêhdar ve bi nala sizayê ve bide bivegerandin; jiber ku wî Kirêhdar berî bi dawîhatîna kirya xanî ve dayîte biderxistin.

17

Bendên (79 – 87) bi xerabkirî ve êtin biderkevtin.

Benda 88

Heger ku Bazirganekî Dexîdan bi karê ve date biqerzdarikirin, weha ew li ser her şêst Ko ji Dexilûdan ve ji her Kor17 ve bi kar ve dide biwergirtin; lêbelê heger ku wî pere bi kar ve datin bidan, weha ew li ser her Sekel Zîv de Yek li ser Şeşan û 6 Gran de bi nala kar ve dide biwergirtin.

Benda 89

Heger ku li ser Merovekî Azad de qerzek bête biderkevtin û perê di nava destên wî de ji bona vegerandinê ve nayêtin biderkevtin, lêbelê ew bi xwedanê Dexxilûdan ve tête biderkevtin (weha divê li ser Bazirgan de) Dexilûdan ji dêlva perê xwe ve (ligel karê ve) li gora danîna endazîya buhabûna Padîşah de bide biwergirtin.

Benda 90

Heger ku Bazirganekî bi nala karê ve bi bêtir ve ji nala ser her 300 L (Dexilûdan 60 L (yanjî li ser her 1 Sekel bêtir de ji nala Yek ve li ser şeşan û 6 G(ran) zîv de (…) date (bi)wergirtin (?), weha ew h (mûyê hanê), çîyê ku wî ew dabû bidan, dide bi(windakirin).

Benda 91

Heger ku Bazirganekî Dexilûdan yanjî Zîv bi kar ve dabûn bidan û bi nala karê ve (ji bona) dexilûdan û Zîv ve dane biwergirtin. (…) ne (… ku: ne bihev re ji bona ser jimarê18 ve bêtin biservekirin (?) (Di pişt re valabûnek tête biderkevtin.)

Benda 92

(Bi xerabkirî ve tête biderkevtin).

Benda 93

(Heger ku Bazirganekî) (?) … yanjî De (xilûdan) û (yanjî) (?) … weha bi pirbûn ve dabû biwergirtin, nede bikêmkirin û ew qafikekî19 nuh nede binivîsandin yanjî karê bi ser sermiyan ve dide biservekirin, weha divê ev Bazirganê hanê hemû dexiludan, ji yê ku wî ew dabû biwergirtin, bi ducarî ve bide bivegerandin.

Benda 94

Heger ku Bazirganekî Dexilûdan yanjî Pere bi nala qerzekî kar ve date bidan û di gava danê de bi nala qerzkirina kara zîv ve li gora (giranbûna) sivik de yanjî Dexilûdan li gora pêvana biçûk de date bipîvandin, lêbelê di dema wergirtinê de bi dij ve zîv li gora (giranbûna) giran ve, Daxilûdan li gora pîvama mezin ve date biwergirtin, weha (ev Bazirganê hanê) bi hemûyî ve,(çiyê ku wî dabû biqerzkirin), pê tête bisizadankirin.

Benda 95

Her ku (Bazirganekî.) (…) bi nala qerzekî karê ve Cenawerek yanjî pere dane bidan û (…) û (…) date bidan, weha ew bi hemûyî ve, ciyê ku wî dabû biqerzkirin, pê tête bisizadankirin.

Benda 96

Heger ku Merovekî Dexilûdan yanjî pere ji Bazirganekî ve date biqerzkirin û ew ne bi xwedîyê Dexilûdan yanjî Pera ve ji bona vegerandinê ve tête biderkevtin, (lêbelê ew bi

17 Her Korek bi nala 300 Qo ve tête biderkevtin.

18 Rechnung: Account: Jimar, Jimêr

19 Tafel: Table: Qafik. Kêl.

xwedanê) malên din ve tête biderkevtin, weha ew hemûyî, çiyê ku ew xwe di nava destên wî de didin bidîtin, di beramberî Govan de; ji yê ku

ew (bi rastî ve) dikare bide bianîn (?), ji bona Bazirgan ve dê bide bidan; weha divê li ser Bazirgan de ku ew tu dujwarîyan nede bidurustkirin û ew divê (vê) bide biwergirtin. (weha bi dû vê vevalabûnek tête biderkevtin).

Benda 97

(…,) (Weha divê ew bête bikuştin).

Benda 98

Heger ku Merovekî ji bona Merovekî (din) ve pere ji bona hevbeşîyê ve date bidan, weha divên ku ew karê û ziyanê bi mîna hev ve li hevdû de bi beramberi Xwedan (?) ve, ji ya ku tête biderkevtin, bidin biveparvekirin.

Benda 99

Heger ku Bazirganekî ji bona Firoştvanekî Rêwî ve pere bi karê ve ji bona kirîn û (firotinê) ve date bidan wî ew ji bona ser rê ve date binardin, weha (…);

Benda 100

Heger ku wî li wê derê de, li çi cihê ku ew dihate biçûyîn, (kar) didate bicihkirin, weha divê ku ew bêtirbûnê li ser hemû peran de, ji yên ku wi dabûn biwergirtin, bide bitomarkirin, di pişt re merov rojên xwe dide bijimartin, û ew divê dilê Bazirganê xwe bide bixweşkirin.

Benda 101

Heger ku ew li wêderê de, çi cihê ku ew ji bona wêna ve dihate biçûyîn, tu kar nedidate bidestxistin, weha divê li ser Firoştdarê rêwî de perên, ku wî dabûn biqerzkirin, bi du carî ve ji bona Bazirgan ve bide bidan.

Benda 102

Heger ku Baziganekî ji bona Firoştdarekî rêwî ve pere bi nala kirînûfiroina hevbeşî ve date bidan û li wêderê de, çi cihê ku ew ji bona wêna ve dihate

biçûyîn, zîyan pê dihate bikevtin, weha divê ew ji bona Bazirgan ve bes û bi tenha ve sermiyanê ji peran ve bide bivezîvirandin.

Benda 103

Heger ku Firoştdarekî Rêwê li ser rê de hate bitazîkirin, weha divê ew bi Xwedan ve bide bisûnxwarin û ew êtir bi gerdenazad ve tête biderkevtin.

Benda 104

Heger ku Bazirganekî ji bona Firoştdarekî Rêwî ve dexilûdan, hirî, zeyt yanjî malekî din bi qerzkirinê ve ji bona firoştinê ve date bidan, weha divê li se Firoştdarê Rêwî de perên wergirtî bide bitomarkirin û ew wan ji bona Bazirgan ve bide bidan û divê Firoştdarê Rêwî qafikekî morkirî bi perên dayî ve ji bona Bazirgan ve bide biwergirtin.

Benda 105

Heger ku Firoştdarê Rêwî bi sersar ve bête biderkevtin û wî qafikekî morkirî li ser wan perên dayî de ji bona Bazirgan ve ne dabe biwergirtin, weha dê perên, ji yên ku ew bi tu qafikên morkirî ve neyêtin biderkevtin, ne li ser jimêrê20 de bêtin bidanîn.

20 Rechnung: Account: Jimêr, Jimar; Jimartin.

19

Benda 106

Heger ku Firoştdarekî Rêwî ji Bazirganekî ve pere dane biqerzkirin û vî ji bona Baziganê xwe ve ew date binayînîkirin, weha divê li ser Bazirgan de ku ew li ser Firoştdarê rêwî de li ber Xwedan û Govanan de bi wergirtina peran ve bide bicihkirin, û divê li ser Firoştdarê Rêwî de ji bona Bazirgan ve hemû perên qerzkirî bi sê cari ve bide bidan.

Benda 107

Heger ku Bazirganekî pere ji bona Firoştvanekî Rêwî ve date bisipartin û Firoştvan hemûyê, çiyê ku vî Bazirganê hanê ji bona wîna ve dabû bidan, ji bona Bazirgan ve dabû bivezîvirandin û Bazirgan ev date binayînîkirin, weha divê li ser Firoştvanê rêwî de li ser Bazirgan de li beramber Xwedan û Govan de vegerandina sipartinê bide bicihkirin, weha divê li ser Bazirgan de ji bona Firoştvanê Rêwî de bi şeş carî ve ji hemû perên sipartî ve bide bidan; jiber ku wî wergorina perên sipartî ji Firoştvanê Rêwi ve dabû binayînîkirin.

Benda 108

Heger ku Xwedîya Meyxaneyekê bi nala buhayê Avceh21 ve tu dexilûdanekî nade biwergirtin, bi dijî vê ve li gora (giranbûna) (Kevirê Mezin ve) pere dana biwergirtin, wetov ku buhayê bazirganîyê ji bona Avceh ve bi biramberî buhayê dexiûdan ve dayîte bibilindkirin, weha ku heger merov vê li se vê Xwedîya Meyxana hanê ve bide bicihkirin, weha divê merov vê Firoştdara Meyxanê ji bona nava avê ve bide biavêtin.

Benda 109

Heger ku Xwedîya Meyxaneyekê, ji ya ku di xanîyê wê de Sextekaran xwe bi serhevdû ve dane bigirêdan, van Sextekaran nede bigirtin û wan ji bona Kaxê22 ve nede biberdestkirin, weha divê ev Xwedîya Meyxanê bête bikuştin.

Benda 110

Heger ku Dêhlikek23 Perestgehê yajî Dêhlikek, ji ya ku ew di dêrê de nayête birûniştin, xanîyekî Xwedîya Meyxanê date bivekirin yanjî (wehajî) bi mebesta vexwarina Avcehekê ji bona nava xanîyê Xwedîya Meyxaneyekê ve hate biderbasbûn, weha divê ev Jina hanê bête bişewitandin.

Benda 111

Heger ku Xwedîya Meyxaneyekê Şerbikekî Avcehê bi qerze ve date bidan, weha divê ew ji bona wî ve di dema çinîne de bi beramberî 5 L dexilûdan ve bide biwergirtin.

Benda 112

Heger ku Merovekî Azad xwe li ser rêwîbûna rêya bazirganyê de date bidîtin û wî zîv, zêr, kevirên giranbuha, yanjî malên livandî dinîyî xwe ji bona Merovekî dinî Azad date bisipartin, ku ew di rêya wî de de bêtin biveguhestin, lebelê vî Merovê Azad hemû, ciyî ku divabû ew ji bona wêderê ve bihata biveguhestin, ne ji bona cihê xwe ve hate bibirin, lêbelê wî ew ji bona rexekî ve ji xwe re dane bihilanîn, weha li ser Xwedîyê Malên veguhestî de li ser vî Merovê hanê de bi tawanbarîyê ve ji bona wan hemû tiştan ve bide bicihkirin, ji yên ku divabû ew wan bide biveguhestin, lêbelê wî ew nedane bigihandin, weha divê li ser wî Merovê Azad de, ji yê ku wî divabû ew malên hanê bidana biveguhestin, lêbelê wî ew nedane biveguhestin, ji bona Xwediyê malên veguhestî ve pêncarî bi beramberî ve ji yê wergirtî ve bide bidan.

21 Bier: Beer: Avceh

22 Palast: Palace, Court: Kax, Qesir.

23 Hure: whore: Dêhlik Felîte,

20

Benda 113

Heger ku Merovekî Azad beramberî Merovekî dinî Azad bi xwedanê (deynekî) ve ji dexilûdan yanjî zîv ve hate biderkevtin û ku wî bi bê destûra Xwedîyê dexilûdan ve dexilûdan ji enbarê ve yanjî ji ser erdê binderê ve ji xwe re date bihilanîn, weha divê li ser wi de ew hemû dixilûdan bide bivegerandin, ji yê ku wî dabû bibirin, wehajî ew hemû tiştên dînî bi qerzkirî ve dide biwindakirin.

Benda 114

Heger ku Merovekî Azad bi tu deyndarîyê ve bi beramberî Merovekî Azad ve bi dexilûdan û peran ve nayête biderkevtin, lêbelê wî destên xwe ji bona ser yekekî ve ji Girawvanên wîna va dayîte bidan, weha divê ew ji bona her yekekî Girawkirî ve 1/3 ji Mina Zîv ve jêre bide bidanin.

Benda 115

Heger ku Merovekî Azad bi biramber Merovekî ve deyndarîyek ji dexilûdan û peran ve bête biderkevtin û wî destên xwe ji bona Girawvanên wî ve date bidan, lêbelê Girawvan di mala dest li ser de bi mirineke serûştî ve hate bimirin, weha ev kêşa hanê ne bi hoyê gilîbûnê ve tête biderkevtin.

Benda 116

Heger ku Girawvanek di mala dest li ser de di rêya lêdanê de yanji di pîsbûna reftarîkirinê de hate bimirin, weha divê Xwedîyê Girawvan vê li ser Bazirganê xwe de bide bicihkirin, û heger ku ew bi kurê Merovekî Azad ve dihate biderevtin, weha divê Merov kurê wî bide bikuştin, lêbelê heger ku ew bi Bendê Merovekî Azad ve bête biderkevtin, weha divê ew 1/3 ji Mina Zîv pê bide bidan; wehajî ew hemûyî, ji yê ku wî ew bi nala deyn ve dabû bidan, dide biwindakirin.

Benda 117

Heger ku divabûna deynekî li ser Merovekî Azad de hate bidîtin û wî jina xwe, kurê xwe yanjî keça xwe ji ber vê ve date bifiroştin yanjî wî ew ji bona pêwendîyeke karkirinê ve date bidan, weha divê li ser wan de ku ew bi dirêjbûna sê salan ve di nava mala Kirîdarê xwe de yanjî Qerzdarê xwe de bidin bikarkirin, ji yê ku wî ew ji bona pêwendîya karkirinê ve dane biwergirtin, di sala çeremîn de divê ji bona wan ve azadîya wan bête bivegerandin.

Benda 118

Heger ku Bendekî yanjî Bendekê ji bonna pêwendîya karkirinê ve hate bidan, kirîda ew ji bona demekê ve (ji bona yekekî din ve date bidan), ji bona zîv ve date biforştin, weha ev ne bi mafe24 ve têtе biderkevtin.

Benda 119

Heger ku Merovekî Azad divabû Benda xwe bi peran ve bide bifiroştin, ji ya ku wê jêre zarok dabûn bizayîn, weha Xwedîyê Bendê dikare perên, ji yên ku Bazirgan jêre dabûn bidan, bide bidan û ew Benda xwe bide biazadkirin.

Benda 120

Heger Merovekî Azad dexilûdanê xwe ji bona enbarkirinê ve di mala Merovekî Azadî din de date bienbarkirin û ew di enbarê de zîyan pê hate bikevtin, yanjî xwedîyê malê enbarê dide bivekirin û ew ji xwe re dexilûdan dide bibirin, yanjî ku ew bi carekê ve tevaya dexilûdan dide binayînîkirin, ji ya ku wî ew di mala xwe dabû bihilanîn, weha divê li ser Xwedîyê

24 Vindikation: Viducation: Ne bi mafe ve,

dexilûdan de li ber Xwedê de bi rastîya dexilûdanê xwe ve bide bisûndxwarin, divê li ser Xwedî malê de, ji yê ku wî dexilûdan ji xwe re dabûn bibirin, bi ducarî ve dexilûdan ji bona xwediyê wê ve bide bivezivirandin.

Benda 121

Heger ku merovekî Azad di mala Merovekî Azadî din de dexilûdan date bihilanîn, weha divê ew li ser her 300 Litir dexilûdan de 5 Litir dexilûdan di her salekê de bi kirya hilanînê ve bide bidan.

Benda122

Heger ku Merovek Azad zîv, zêr yanjî tiştekî din bi mebesta paraztinê ve date bidan, divê ew Govanan25 li ser dayînê de bide bidayîn û ew divê li ser de peymanan bide bigirêdan û di pist re divê ew wan bide bisipartin.

Benda 123

Heger ku wî bi bê Govan û bi bê peymangirêdan ve ji bona paraztinê ve date bidan û wan wergirtina wan tiştan li cihê nîsankirina wan de datin binayînîkirin, weha kêşa vi gilîyê hanê nayête biwergirtin.

Benda 124

Heger ku Merovekî Azad zîv, zêr yanjî tiştekî din li ber çavên Bînvanan de ji bona paraztinê ve date bidan û wî ew date binayînîkirin û di pişt re ew li ser vî Merovê Azad de hate bicihkirin, weha divê ew ducarî li ser yê nayînîkirî de bide bidan.

Benda 125

Heger ku Merovekî Azad hinek ji malê xwe ve bi mebesta paraztinê ve date bidan û di cihê dana mal de malê wî ligel malê Xwedîyê malê de di encamê dizyekê yanjî talankirinekê de hate biwindakirin, weha divê li ser Xwedîyê malêyî tembel de26, ji yê ku ew bi hoyê windabûna malê pê siparti ve tête biderkevtin, tevaya malê sipartîyî windakirî ji bona Xwedîyî wî ve bide bivezîvîrandin û weha divê li ser Xwedîyê malê de ew li malê windakirî de bête bigerandin û ew wî ji dizê xwe ve bide bisitendin.

Benda 126

Heger ku Merovekî Azad tu tişt ji malê xwe ve nedabe biwindakirin; lebelê ew dide bigotin, ku male wî hatîye biwindakirin û ew dixwaze bi hoyê zîyana derewbûna malê xweyî newindakirî ve bi zîyana xwe ve li ber

Xwedan ve bide bigilîkirin. Weha divê ew li ser tevaya zîyana derewbûna xwe de ducarî bide bidan.

Benda 127

Heger ku Merovekî Azad bi tilîya xwe ve bi navdûxistinekê ve ber bi çavên Jîneke Perestgehê ve yanjî jîna Merovekî Azad ve date bikirin; lêbele tu tişt li ser wan de nayête bicihkirin. Weha divê ew Merovê hanê ji bona ber Dadweriye ve bête bianîn û cinkên wî bêtin bijêkirin.

Benda 128

Heger ku Merovekî Azad jinek date biwergirtin û wî tu peymanên girêdayî pê nedane bidurustkirin, weha ev jina hanê ne bi mêrkirî ve tête biderkevtin.

25 Zeugen: Witness: Govan: Bînvan

26 Nachlässig:Careless: Tembel, Pıştsist, Tiral.

22

Benda 129

Heger ku jineke Merovekê Azad bi paldayî ve ligel Merovekî Azadî din de hate bigirtin, weha merov herduwan bi hev re dide bigirêdan û wan ji bona nava avê ve dide biavêtin, heger ku mêrê jînê jîna xwe bi jînê ve bide bihiştin. wehajî Padîşah dikara jîna bendê xwe bide bihiştin.

Benda 130

Heger ku Merovekî bi darêzorê ve di himbêza jîna Merovekî Azad de, ji ya ku wê ew hêji nedida binaskirin, ji yê ku ew ji bona nava mala bavê wê ve hatibû bimêvankirin, didate birazandin û merov ew di wêgavê de date bigirtin, weha divê ev merovê hanê bête bikuştin; ev jîna hanê dê bête birizgarîkirin.

Benda 131

Heger ku jina Merovekî Azad ji bal mêrê xwe ve hate bitawanbarkirin, lebelê ew di dema razanê de ligel merovekî din de nehate bigirtin, weha divê ew bi Xwedan ve bide bisûnxwarin û ew ji bona mala xwe ve bête bivegerandin.

Benda 132

Heger ku tilî ji bona jîna Merovekî Azad bi hoyê Merovekî din de hate bidirêjkirin, lêbelê ew di dema razana ligelhevdû de ligel merovê din de nehate bigirtin, weha ew divê ji bona xatirê çavê mêrê xwe ve xwe ji bona nava çem ve bide biavetin.

Benda 133

Heger ku Merovekî Azad hate bidîlvekirin, lêbelê di nava mala wî de hêjî xwarin tête bidîtin, weha jina wîna, tanî ku mêrê wê bi dîl ve tête biderkevtin, mal û malê wî dide biparasztin, tanî ku mêrê wê bi dîl ve tête biderkevtin; ew divê ji bona nava mala yekekî Azadî din ve neyête bikevtin.

Heger ku wê jina hanê xwe neda biparaztin û ew ji bona mala merovekî din ve hate bikevtin, weha divê merov vê li ser wê jîna hanê de bide bicihkirin û divê merov wê ji bona nava çem ve bide biavêtin.

Benda 134

Heger ku Merovekî Azad hate bidîlvekirin û di nava mala wî de tu xwarin nayête biditin, weha dikara jîna wîna ji bona nava maleke din ve bête bekevtin; ji bona vê jina hanê ve tu guneh nayête biderkevtin.

Benda 135

Heger ku Merovekî Azad hate bidîlvekirin û di nava mala wî de tiştekî ji bona xwarinê ve nayête bidîtin, berî vegera wî jina wîna ji bona mala yekekî din ve hate bikevtin û zarok dane bizayîn, di piştî wê re mêrê wê

hate bivezîvirandin û ew ji bona bajarê xwe ve hate bigihandin, weha divê ev jina hanê ji bona mêrê xweyî pêşî ve bête bivezîvirandin û zarok ji bona bavê xwe ve bêtin bivegerandin.

Benda 136

Heger ku Merovekî Azad bajarê xwe rûsarkir û wî date bibazdan, di piştî wî re jina wîna ji bona nava mala yekekî din ve hate bikevtin,, weha heger ku ev Merovê Azad hate bivezîvirandin û wî date bixwestin, ku ew jina xwe bide bivezîvirandin, weha divê li ser vê jina mêrê revyayî de neyête bivezîvirandin; jiber ku wî bajarê xwe dabû birûreşkirin û wî dabû bibazdan.

23

Benda 137

Heger ku Merovekî Azad date bixwestin, ku ew navmalîya xwe bide biberdan, ji ya ku wê jêre zarok dabûn bianîn, yanjî ku ew jinekê bide biberdan, ji ya ku wê jêre zarok dabûn bianin, weha divê merov ji bona vê jîna hanê ve qelenê wê bide bivezîvirandin, wehajî divê Merov ji bona wêna ve perçeyekî ji zevî, bax û hebûna livandî ve bide bidan û ew wisa pê zarokên xwe bide bixwedîkirin, di piştî ku wê zarokên xwe dane bimezinkirin, merov jê re ji hemûyî ve dide bidan, çiyê ku ew ji bona zarokên wêna ve tête bidan, beşekî bi mîna ku ew ji bona kur ve ji paşmayîn ve tête bidan; Êtir ew dikare mêrekî li gora dilê xwe de ji xwe re bide bihilgirtin.

Benda 138

Heger ku Merovekî Azad date bixwestin, ku ew xwe ji malîya xwe ve bide biberdan, ji ya ku wê jêre tu zarok nedane bianîn, weha divê ew ji bona wêna ve pera li gora bilindbûna qelenê wê de bide bidan, wehajî ew ji

dêlva diyarîyan ve dide bidan, ji yên ku wê ew ji mala bavê xwe ve bi xwe re dabûn bianîn; di pişt re ew dikare xwe jê bide biberdan.

Benda 139

Heger ku qelen neyête bixuyanîkirin, weha divê ew ji bona wêna ve 1 Mine Zîv bi nala perê berdanê ve bide bidan.

Benda 140

Heger ku ew bi jêrdest ve bête biderkevtin, weha divê ew ji bona wêna ve 1/3 Mine Zîv bide bidan.

Benda 141

Heger ku jineke Merovekî Azad, ji ya ku ew di nava mala merovekê Azad de tête bijîyandin, date bixwestin, ku ew ji bona dervêyî malê ve bête biçûyîn û ku ew ji perên xwe ve maldarîyê bide bikomkirin, mala wê pê tête bibêxwedîkirin û mêrê wê tête bibêguhlêkirin, weha merov vê li ser de dide bicihkirin, û heger ku mêrê wê berdana wêna date bixwestin, weha ew xwe jê dide biberdan; û perên berdanê dê ew ji bona wêna ve nede bidan; heger ku mêre wê berdan nedate bixwestin, weha mêrê wê dikare jineke din ji xwe re bide biwergirtin, ev jîna pêşi di nava mala mêrê xwe de bi nala Bendeyekê ve tête bijîyandin.

Benda 142

Heger ku jinek mêrê xwe dide bipîskirin û date bigotin „ku tu nema bêtir êtir li nik min de dide bixekirin“, weha divê pirsa wê di civata bajarê wê de lê bête binêrîn, û heger ku ew bi rusîpî ve û bi bê guneh ve bête biderkevtin, bi serevajî ve mêrê wê ji bona derveyî malê ve tête derkevtin û ew gelekî guhpêdanê pê nade bikirin, weja ji bona vê jîna hanê ve tu guneh nayête bidîtin, ew qelenê xwe ji xwe re dide biwergirtin û ew ji bona nava mala bave xwe ve tête biçûyîn.

Benda 143

Heger ku ew ne bi rûsipî ve bête biderkevtin, nemaze ku ew ji bona derveyî malê ve tête biçûyîn, mala xwe dide bixerakirin, namûsa mêrê xwe dide bişikenandin, weha divê merov vê jina hanê ji bona nava avê ve bide biavêtin.

Benda 144

Heger ku Merovekî Azad ji xwe re jinek27 date bianîn û vê jina hanê ji bona mêre xwe ve navmalîyek date bianîn û wê zarok datin bianîn, vî merove hanê date bixwestin, ku ew vê

27 Li vir de ev jin bi jineke Perestgehê ve tête biderkevtin. Cuma

navmalîya hanê ji xwe re bide bianîn, weha merov destûrê ji bona vî merovê hanê ve nade bidan, jiber ku ew divê jineke din ji xwe re bide bianîn.

Benda 145

Heger ku Merovekî Azad jinek28 ji xwe re date bainîn û ew nikare ji bona wîna ve tu lawan bide bizayîn, weha wî date bibiyarkirin, ku ew ji xwe re navmalîyekê bide bianîn, weha ev merovê hanê dikare ji xwe re navmalîyê bide biwergirtin û ew wê ji bona nava mala xwe ve bide bianîn; lêbelê ev navmalîya hanê merov wê bi nala jina duwem ve dide bidanîn û wê ne bi mîna jina peşi ve tête bidanin.

Benda 146

Heger ku Merovekî Azad jinek29 date bianîn û wê ji bona mêrê xwe ve navmalîyek date bidan û wê lawik dane bidan, pêre ev navmalîya hanê ligel xatûna xwe de bi mîna hev ve tête bidanîn, jiber ku wê lawik dane

bizayîn, weha xatûna wêna nikarre wê bi zîv ve bide bifiroştin, yanjî wê bide bibendkirin, yanjî wê bi nala Bendan ve bide bidanîn.

Benda 147

Heger ku ew tu lawikan nede bizayîn, weha Xatûna wêna bi zîv ve dikare wê bide bifiroştin.

Benda 148

Heger ku Merovekî Azad jînek date bimahrkirin û ew bi nexweşîyeke vegirtî ve hate bikevtin, wî xwest, ku ew jineke din ji bona xwe ve bide biwergirtin, weha ew dikare wê ji xwe re bide bianîn; ji jina xwe ve, ji ya ku ew bi nexweşîya vegirtinê ve hatibû bikevtin, ew nikare xwe jê bide biberdan; di xanîyekî de, ji yê ku wî dabû biavakirin, ew têde tête bijîyandin, û tanî ku ew tête bijîyandin, ew divê wê bide bixwedikirin.

Benda 149

Heger ku ev jîna hanê di mala mêrê xwe de naxwaze bête bijîyandin, weha divê ew ji bona ve tevaya diyarîyên wê bide bidan, ji yên ku wê ji mala bavê xwe ve ligel xwe de dabûn bianîn, û ew dikare bête biçûyin.

Benda 150

Heger ku Merovekî Azad ji bona jina xwe ve zevî, bax, xanî yanjî malên livandî date bidiyarîkirin, belkeyekî morkirî li ser wan de jêre date bihiştin, weha zarokên wê li paş mirina merê wê de nikarin jê tu tiştî bidin bixwestin; Dê paşmayê xwe dikara ji bona kurê xwe ve bide bidan, ji yê ku ew jê dide bihezkirin; ji bona yekekî din ve ew dikare paşmayê xwe nede bidan.

Benda 151

Heger ku jînek di nava mala Merovekî Azad de date bikarkirin û wê hevpeymanek ligel mêrê xwe de date bilidarxistin, ku deyindarê merê wê

destên xwe ji bona wêna ve nade biavêtin û wê ji bona wîna ve bi belgeyekî nivîsandî ve date bipêskeşkirin û heger ku li ser wî Merovê Azad de deynek berî bi mahrkirina wîna ve ligel wê jina hanê de bête biderkevtin, ji bona deyindarê wî ve destdirêjkirina xwe ji bona jina wîna ve nayête biderkevtin. Herwehajî heger ku deynek li ser wê jîna hanê ve berî kevtina wêna ve ji bona nava mala wî merovê hanê ve bête biderkevtin, ji bona deyindare ve nayête biderkevtin, ku ew destdirêjîyê ji bona jîna wî ve bide bidirêjkirin.

28 Li vir de ev jin bi jineke Perestgehê ve tête biderkevtin. Cuma

29 Li vir de ev jin bi jineke Perestgehê ve tête biderkevtin. Cuma

25

Benda 152

Heger ku piştî kevtina vê jina hanê ji bona nava mala mêrê xwe ve deyin li ser wan de hatin bikomkirin, weha divê li ser wan herduwan de deyin ji bona Bazirgan ve bidin bidan.

Benda 153

Heger ku jinek bi hoyê mirina mêrê xwe ve bi xatirê merovekî din ve hate biderkevtin, weha divê ev jina hanê bête bisingkirin.

Benda 154

Heger ku Merovek Azad ligel keça xwe de date bixewkirin, weha divê ev Merov Azad ji bajêr ve bête bidûrkirin.

Benda 155

Heger ku Merovekî Azad Bûkek ji bona kurê xwe re date bihelbijartin û kurê wî ligel wê de hate bixewkirin; lêbelê di pişt re ew di himbeza wê de tête bixewkirin û ew wetov tête bigirtin, weha divê merov vî merovê hanê bide bigirêdan û wî ji bona nava avê ve bide biavêtin.

Benda 156

Heger ku Merovekî Azad Bûkek ji bona kûrê xwe ve date bihelbijartin û kurê wî hêjî ligel wê de nehatîye bixewkirin; lêbelê ew di himbêza wê de tête bixewkirin, weha divê li ser wî de ku ew nîv Man ji zîv ve jêre bide bidan û divê ew ji dêlva hemû diyarîyên anînî ve ji mala bavê wê ve bide bidan û di pişt re ew dikare yekekî li gora dilê xwe de bide bikirin.

Benda 157

Heger ku Merovekî Azad di piştî mirina bavê xwe de ligel Dêya xwe de date bixewkirin, weha divê herdu bêtin bisûtandin.

Benda 158

Heger ku Merovekî Azad di piştî mirina bavê xwe de di himbêza Dêya Perwerdekirina xwe de, ji ya ku wê zarok dabûn bizayîn, hate bigirtin, weha divê ev merovê hanê ji mala bavê wî ve bête biderkevtin.

Benda 159

Heger ku Merovekî Azad ji bona mala Xezûrê xwe ve nîşan datin bianîn û qelen date bidan, êtir lêbelê di piştî ku ew ji bona jineke din de çavên xwe dide biberdan û ew ji bona Xezûrê xwe ve dide bigotin: „ez nema keça te didim biwergirtin“, weha bavê keçê hemûyî dayî ji xwe re dide bihiştin, ji yê ku ew jêre hatîye bidayin.

Benda 160

Heger ku merovekî Azad ji bona mala xezurê xwe ve nîşan datin bianîn û qelen date bidan, lêbele bavê keçê date bigotin: „Ez keça xwe ji bona te ve nadim bidan“, weha divê ew hemû dayê, ji yê ku jêre hatibûn bidanîn, bi ducarî ve bide bivezîvirandin.

Benda 161

Heger ku Merovekî Azad ji bona mala xezurê xwe ve nîşan datin bianîn û qelen date bidan û hevalê wî lê date bigelacîkirin, Xezur ji bona mîrzayê mêrê ayindeyî ve date bigotin: „Tu keça min nade biwergirtin“, weha divê ew hemû dayê, ji yê ku jêre hatibû bianîn, bi ducarî ve bide bivezîvirandin; lêbelêjî hevalê wî jî ew nikare jîna wî ji xwe re bide biwergirtin.

26

Benda 162

Heger ku Merovek Azad ji xwe re jînek date bianîn, wê ji bona wîna ve zarok date bianîn û di pişt re ev jina hanê tête bimirin, weha bavê wîna nikara daxwaza anînên ligel wê de bide bikirin; jiber ku anînên ligel wê de bi malên zarokên wê ve têtin biderkevtin.

Benda 163

Heger ku Merovekî Azad ji xwe re jinek date bianîn, wê lêbelê ji bona wina ve tu zarok nedane bipeydakirin, di pişt re ev jîna hanê tête bimirin, weha heger ku xezurê wî qelen ji bona wîna ve dabû bivezîvirandin, ji yê ku vî merovê hanê ji bona mala xezurê xwe ve dabû bianîn, ji bona mêr ve nayête biderkevtin, ku ew daxwaza bi anînan ve bide bikirin; jiber ku bianîn bi malên mala bav ve têtin biderkevtin.

Benda 164

Lêbelê heger ku xezur qelen ji bona wîna ve nede bivezîvirandin, weha divê ew ji anînên wê ve bide bikêmkirin, weha bi mîna ku pirbûna qelen tête biderkevtin û ew divê aninên wêyî mayî ji bona mala bavê wê ve bide bivezîvirandin.

Benda 165

Heger ku Merovekî Azad ji bona kurê xweyî şêrîn ve li ber dilê xwe de zevîyek, baxek, xanîyek date bidiyarîkirin û wî jê re pê belgeyekî morkirî date binivîsandin, weha di pişt re bav tête bimirin, êtir bira diyarîyê didin biparvekirin, ji ya ku bavê wî jêre dabû bidan, bi serdejî ve ew di nava hevdû de maldarîya mala bavê xwe didin biparvekirin.

Benda 166

Heger ku Merovekî Azad ji bona zarokên xwe ve jin datin bianîn û wî jinek ji bona lawê xweyî biçûk ve hêjî nedayî bianîn û bav tête bimirin, weha gava ku bira malên mala bavê xwe li hevdû de didin biparvekirin, weha divê ku ew ji bona ser pişka birayê xwe ve perên qelen bidin biservekirin, ji yê ku jin jê re nehatîye bihatin, da ku ew têra anîna jinekê jêre bêtin bikirin.

Benda 167

Heger ku Merovekî Azad jinek ji xwe re date bainîn û wê ji bona wîna ve lawîk datin bizayîn û di piştî mirina wê de wî ji xwe re jineke din date bianîn û wê lawîk datin bianîn û di pişt re bav tête bimirin. Lawik ne li gora bingehê dêyan de didin biparvekirin; ew bi rastî ve anînên dêyan ji xwe re didin bibirin û di pişt re maldarîya mala bavê xwe di nava xwe de didin biparvekirin.

Benda 168

Heger ku Merovekî Azad kurekî xwe date biderkekirin û wî ji bona dadwerîyê ve date bigotin „ez dixwazim kurê xwe bidim biderkirin“, weha divê Dadwer kêşa wî lê bidin bilêvenerandin, û heger ku kur gunehekî ne pir mezin dabe bikirin, ku ew ji para paşmayê bavê xwe ve divê bête bibêparvekirin, weha bav nikare, ku ew kurê xwe ji para paşvemayîna kurîtîyê ve bide bibêpişkirin.

Benda 169

Lêbelê heger ku wî gunehekî mezin beramber bavê xwe dabe bikirin, ku ew ji bona bêpişkbûna wî ve ji kuretîyê ve tête biderkevtin, weha divê merov lê di cara pêsin de bête bilêbuhurandin; lêbelê heger ku wî gunehekî mezin di cara duwem de dabe bikirin, weha bav dikare kurê xwe ji para paşvemayîna kuretîyê ve bide bibêpişkirin.

27

Benda 170

Heger ku jina Merovekî Azad jêre kur dane bizayîn û Benda wî jî jêre kur dane bizayîn û bav di dema jîyana xwe de ji bona kurên xwe ve date bigotin, ji yên ku Benda wî jêre dabûn bizayîn:“Hûn bi kurên min ve têtin biderkevtin“, ku ew wan bi nala kurên jina xweyî pêşî ve dide bidanîn, di pişt re bav tête bimirin. Kurên jina pêşin û kurên bendê maldarîya mala bavê xwe bi mîna hev ve li hevdû de dide biparvekirin. Kurê mezin, ji yê ku ew bi kurê jina pêşîn ve tête biderkevtin, ji xwe re perçê bi dilê xwe ve dide bihelbijartin û bibirin.

Benda 171

Lêbelê heger ku bav di jîna xwe de ji bona kurên Benda xwe ve, ji yên ku Bendê ew jêre dabûn bizayîn, „Hûn bi kurên min ve têtin biderkevtin“, ne date bigotin û bav hate bimirin, weha kurên Bendê ligel kurên jina pêşîn de maldarîya mala bavê xwe nadin biparvekirin; weha divê azadî ji bona Bendê û kurên wê ve bête bidan û kurên jinê nikarin ji bona kurên Bendê tu karkirinan bidin bixwestin, jina pêşîn dikare anînên xwe û hemû diyarîyên xwe, ji yên ku mêrê wê pê dabûn bidan û jêre li ser qafik de dabûn binivîsandin, ji xwe re bide bibirin û ew dikare di nava mala mêrê xwe de bi dirêjbûna jîna xwe ve bête bimayîn û ew bi xwedanê bikaranînê ve jê re tête biderkevtin, ew nikare wê malê bi zîv ve bide bifiroştin; paşvemayîna wêna bi maldarîya kurên wê ve tête biderkevtin.

Benda 172

Heger ku mêrê wê jêre tu diyarî nedabû bidan, weha divê ku ew jêre qelenê wê bidin bivezîvirandin, û ew ji maldariya mala mêrê xwe ve beşekî bi nala pişka yekekî ji pişka pasvemayînê ve dide biwergirtin; heger ku kurên wê, da ku ew wê ji nava malê ve bidin bidûrkirin, datin bixwestin, weha divê ku Dadwer li kêşa wêna de lê bidin bilêvenerandin û ew divên li ser kurên wê de sizadanê bidin bidanîn; ku ev jina hanê ji nava mala mêrê xwe ve nikare bête bidûrkirin; lêbelê heger ku ev jina hanê bixwaze bête biçûyîn, weha divê ew diyarîyan, ji yên ku mêrê wê jê re dabûn bidan, ji bona kurên xwe ve bide bivezîvirandin û ew anînên ligel xwe de ji nava mala bavê xwe ve ji xwe re bide bihilgirtin; di pişt re ew dikare mêrekî li gora dilê xwe de ji xwe re bide bihilgirtin.

Benda 173

Heger ku vê jina hanê ji bona mêrê xweyî dawî ve lawîk dane bizayîn, di xanîyê ku ew têde hatibû bikevtin, lêbelê di pişt re ev jina hanê hate bimirin, weha anînên30 ligel wê de di nava kurên wêyî berê û niha de têtin biparvekirin.

Benda 174

Lêbelê heger ku ew nema bêtir ji bona mêrê xweyî dawî ve lawikan dide bizayîn, weha nextê wê kurên mêrê wêyi pêşi ji xwe re didin bibirin.

Benda 175

Heger ku Bendeyekî Qesrê yanjî Bendeyekî Jêrdest keça Merovekî Azad date bianîn û wê kur jêre datin bizayîn, weha Xwedîyê Bende nikare bi beramberî kurên keça Merovê Azad ve tu bendîtîyê bide bidaxwazîkirin.

Benda 176

Heger ku Bendeyekî Qesrê yanjî Bendeyekî Jêrdest keça Merovekî Azad date bianîn û gava ku wî ew anî wê nextê mala bavê xwe ji bona nava mala Bendê Qesrêve yanjî ji bona nava mala Bendê Jêrdest ve date bixistin û di pştî ku wan malek dane bidurustkirin û wan bi hevdû re xanîyek dane biavkirin û firaxên malê û pêwistîyên wî dane bipeydakirin, lêbelê di pişt re

30 Mitgiff:Dowry: Next, Cihaz. Qelen

28

Bendê Qesrê yanjî Bendê Jêrdest hate bimirin, Weha dê Keça Merovê Azad nextê xwe bide bibirin; hemûyê din, ji çiyên ku mêrê wê û wê di pştî jîyana wanî bi hev re dane bikomkirin, ew bi du perçan ve têtin biparvekirin, nîv perçe jê Xwedîyê Bende ji xwe re dide bibirin û nîvî din keça Merovê Azad ji xwe re û zarokên xwe re dide bibirin.

Heger ku keça Merovê Azad bi xwedanê tu nextê ve neyête biderkevtin, weha ew hemû ji bona du perçan ve didin biparvekirin, ji çîyên ku mêrê wê û wê di pştî jîyana wanî bi hev re dabûn bikomkirin. Nîv perce jê Xwedîyê Bende ji xwe re dide bihilanîn û keça Merovê Azad nîvê din ji bona zarokên xwe re biwergirtin.

Benda 177

Heger ku Biyek, ji ya ku hêji zaroken wê bi bçûk ve têtin biderkevtin, ji bona nava mala yekekî din ve dixwaze bête bikevtin, weha ew bi bêdestûra Dadwer ve nikare bête bikevtin; vêca ku ew dixwaze ji bona nava mala yekekî din ve bête bikevtin, Dadwer li kêşa mala mêrê weyî berî de didin bilêvenerandin, di pişt re ew jê re mala mêrê wêyî berê didin bidan û mêre wêyî dawî û ev jina hanê bi hev re qafikekî bi navrokê ve didin binivîsandin: ku ew dê malê bi rêkûpêk ve bidin bihilanîn û bidanîn, pêrejî Zarokên biçûk bi perwerdekirinê ve bidin bimezinkirin, firaxên

malê bi zîv ve nedin bifiroştin; Kirîdarê, ji yê ku ew firaxên zarokên biçûk dide bikirîn, ew zivên xwe dide biziyankirin; maldarî ji bona maldarîya Xwedîyê wê ve tête bivezîvirandin.

Benda 178

Heger ku yek Entu- Priesterin, Naditu- Priesterin yanjî yekeke Zikru-Priestrin31, ji yên ku bavê wan nextên wan ligel wan de dabû bidan, yek qafik li ser wan de dabû binivîsandin, lêbelê li ser qafik de jê re nedabû binivîsandin, ku ew dikare paşvemaya xwe bi dilê xwe ve ji kê re bide bidan û wî jêre mafeyê pê danûsitendinê nedabû bidan, di pişt re bav tête bimirin, weha zefîyê wê û baxê wê birayên wê didin biwergirtin û ew li gora bilindbûna pişka wêna de xwarin û vexwarinê, rûn û cilûbergan jêre didin bidan û wê didin bidilkirin; lêbelê heger ku Birayên wê li gora bilindbûna pişka wêna de xwarin û vexwarin, rûn û cilûberg jêre nedane bidan û ew nedane bidilkirin, weha ew dikare zevîyê xwe û baxê xwe bi kirêhvanekî ve bide bidan, ji yê ku ew bi serê wê ve tête bikevtin; di pişt re kirêhvanê wê wê dide bixwedîkirin, ew divê bi dirêjîya jîna xwe ve li ser qazanca zefî, bax û hemû dayîna bavê xwe ve bête bijîyandin, ew bi mafeyê bikarnînê ve tête biderkevtin; ew bi zîv ve nikare wan bide bifiroştin, ji bona yekekî din ve ew nikare wan bi paşvemayî ve bide bihiştin; lêbelê paşvemayîna wêna bi xwe ve bi maldarîya birayên wê ve tête biderkevtin.

Benda 179

Heger ku yek Entu- Priesterin, Naditu- Priesterin yanjî yekeke Zikru-Priestrin, ji yên ku bavê wan nextên wan ligel wan de dabû bidan û jêre belkeyekî qafik li ser wan de dabû binivîsandin, li ser belgeyê qafik de dabû binivîsandin, ku ew jêre li gora helbijartina wêna de destûra dana paşmayîna wêna de li gora dilê wê de dide bidan û jêre mafeyê bi karaninê ve dide bidan, di pişt re bav tête bimirin. Ew dikare paşvemayîna

xwe ji bona kesekî ve bi dilê wê ve bide bidan; birayên wê nikarin ber li ber de bidin bigirtin.

Benda 180

Heger ku bavê keçekê ji Nadîneke32-Ayîngeha Dêrê ve yanjî ji yekeke Kulmaşitu-Ayîngeha Xwedanî ve tu next nedabe bidan, weha gava ku bavê wê tête bimirin, divê maldarîyên bavê wê wetov bêtin biparvekirin, ku pişka wê bi nala kurekî xwedan pişka paşmayî ve bête biderkevtin, weha ew bi dirêjîya jîna xwe ve ji qazancê ve dide bikarkirin, ew bi xwedanê

31 Navên Jinên Ayînîyên Perestgehê di zimanê Babilî de têtin biderkevtin. Cuma

32 Dêhlika Dêrê. Cuma

bikarninê ve tête biderkevtin, lêbelê paşvemaya wêna bi xwe ve ji bona birayên wê ve tête bivezîvirandin.

Benda 181

Gava ku bavekî Nadîtu-Pristerin –Benda- xwe yanjî Qadishtu- Pristerin –Dêlikek- yanjî keça perestgehê ji bona Xwedan ve date bidiyarikirin, lêbelê wî jêre tu next nedan bidan, weha gava ku bavê wê tête bimirin, divê ew pişka xwe ji paşmayîna bavê xwe û maldariyên wîna ve li gora yek ji sisyan de ji pişka pasvemayîna xwe ve bide biwergirtin, weha bi dirêjîxa jîna xwe ve ji qazancê ve dide bikarkirin. Lêbelê paşvemayîna wîna bi xwe ve ji bona birayên wê tête bivezîvirandin.

Benda 182

Heger ku bavekî ji bona keça xwe ve, yekeke Naditu-Priesterin ji ya (Xwedanê) Marduk ve ji Babilon ve, tu next pê neda bidan, ji bona wêna

ve tu belkê qafik neda binivîsandin, di pişt re ew tête bimirin, weha pişka wêna yek ji sisyan ve ji pişka paşvenaya yekekî ve ji maladarîya paşvemaya mala bavê wê ve tête biderkevtin, tu erkên hilanîn û danina erd li ser de nayêtin biderkevtin, yekek ji Naditu-Pristerin ve ji ya Marduk ve dikare paşvemayîna xwe ji bona herkesî ve li gora dilê xwe de bide bidan.

Benda 183

Heger ku bavê keçekê, ji yekeke Sugritu-priesterin ve next date bidan û ew ji bona mêrekî ve date bidan û wî jê re li ser de belgeyekî qafik de pê date binivîsandin, di pişt re ew hate bimirin, weha ew di beşdarbûna maldarîya paşvemayîna mala bavê xwe de nikare xwe bide bibeşdarîkirin.

Benda 184

Heger ku Merovekî Azad ji bona keça xwe ve, yekek Sugirtu-Priesterin, tu next neda bidan, nejî ew ji bona mêrekî ve date bidan, di pişt re ew hate bimirin, weha divê li ser birayên wê de nextekî li gora pişka para wê de ji paşvemaya maldarîya bavê wê ve jêre bidin bidan û ew divên wê ji bona mêrekî jî ve bidin bidan.

Benda 185

Heger ku Merovekî Azad lawek ji xwe re bi kurê xwe ve date binavkirin û bimezinkirin, weha kesek nikara vî lawekî xwedikirî bide bidaxwazkirin.

Benda 186

Heger ku merovekî kurekî biçûk bi nala kur xwe ve ji xwe re date biwergirtin, lêbelê wî ji xwe re dabû bidanîn, ku li bav û dêya wîna de hatibû bilêgerandin, weha divê ev kurê xwedîkirî ji bona mala bavê xwe ve bête bivezîvirandin.

Benda 187

Bi lawê navmalyekî dîwana Padîşah ve, bi yekekî ve di nava Qesra Padîsah de û yekekî ji kurên Zikru-Priesterin ve nikare bête bixwestin.

Benda 188

Heger ku yekekî ji desteyên Destkaran kurek bi nala kurkirinê ve ji xwe re date biwergirtin û wî ew bi destkarîya xwe ve date bihînkirin, weha kes nikare vî ji xwe re bide bixwestin.

30

Benda 189

Heger ku ew wî bi destkarîya xwe ve nede bihînkirin, weha ev kurê xwedikirî dikare ji bona nava mala bavê xwe ve bête bivezîvirandin.

Benda 190

Heger ku Merovekî Azad kurekî biçûk, ji yê ku wî ew bi nala kurê xwe ve dabû biwergirtin û wî ew dabû bimezinkirin, lêbelê bi rasti ve wî ew ligel kurên xwe de nididate bijimartin, Weha ev kurê xwedikirî dikara ji bona nava mala bavê xwe ve bête bivezivirandin.

Benda 191

Heger ku Meroveki Azad, ji yê ku wî kurek ji xwe re date bikurkirin û bixwedîkirin, jinek ji xwe re date bianîn, di pişt re jêre lawik hatin biçêbûn û wî xwest, ku ew xwe ji kurê xwedîkirî ve bide bivedûrkirin, weha ev kurê hanê bi destvala ve nayête biçûyîn, bavê wî, ji yê ku wi ew dabû bixwedîkirin, divê ku ew ji bona wîna ve ji maldarîya xwe ve yekekê ji sisyan ve ji paşvemaya xwe ve bide bidan, di pişt re ew dikare bête biçûyîn; ji zevî. Bax û xanîyê xwe ve pêwist niye, ku ew ji bona wîna ve tiştekî bide bidan.

Benda 192

Heger ku lawekî navmalyê dîwanê yanjî ji kurê yek Zikru-Priesterin ve ji bona Bavê xwe ve date bigotin, ji yê ku wî ew dabû bixwedîkirin, yanjî ji bona dêya xwe ve, ji ya ku wê ew dabû bixwedîkirin „tu ne bi bavê min ve tête biderkevtin“ / „tu ne bi dêya min ve tête biderkevtin“, weha merov divê zimanê wî bide bijêkirin.

Benda 193

Heher ku lawekî navmalyê dîwanê yanjî kurê yek Zikru- priesterin bi dizî ve mala bavê xwe date bidîtin û wî date bidestpêkirin, ku ew bavkirinê xwe û dêkirina xwe li ber çavên xwe de bide bireşkirin û ew ji bona nava mala bavê xwe ve bête biçûyîn, weha divê merov çavên wî bide biderkirin.

Benda 194

Heger ku Merovekî Azad kurê xwe ji bona Dayekê ve date bidan, û ev kurê hanê di nava destên Dayekê de hate bimirin, Dayek bi bêdestûra bav û dêya wî ve kurekî din didate bişîrkirin, weha divê merov vê li ser wê de bide bicihkirin, û jiber ku wê bi bêdestûra bav û dêya wî ve kurekî din didate bişîrkirin, weha divê merov pêsîrên wê bide bijêkirin.

Benda 195

Heger ku kurekî li bavê xwe de date bixistin, weha divê merov destên wî bidin bijêkirin.

Benda 196

Heger ku Marovekî Azad çavên kurekî Merovekî dinî Azad date biderkirin, weha divê merov çavên wî bidin biderkirin.

Benda 197

Heger ku wî hestiyên Merovekî Azadi din datin bişikenandin, weha divê merov hestîyên wî bidin bişikenandin.

Benda 198

Heger ku wî çavê Jêrdestekî date biderkirin yanjî wî hestîyên Jêrdestekî date bişikenandin, weha divê ew Mineyeke zîv bide bidan.

31

Benda 199

Heger ku wî çavê Bendeyekî Merovekî Azad date biderkirin yanjî hestîyên Bendeyekî Merovekî Azad date bişikenandin, weha divê ew nîvê buhayê hêjabûna wîna bide bidan.

Benda 200

Heger ku Merovekî Azad diranê yekekî dinî bi mîna xwe ve date bişikenadin, weha divê merov diranê wî bide bişikenadin.

Benda 201

Heger ku wî diranê Jêrdestekî date bişikenandin, weha divê ew 1/2 Mine zîv bide bidan.

Benda 202

Heger ku Merovekî Azad sîlak li hinaroka Merovekî Azadî dinî jê bilindtir de date bilêdan, weha divê ew di dadgehê de bi 60 terîya gav ve lê bête bilêdan.

Benda 203

Heger ku kurê Merovekî Azad ji bona kurê merovekî Azadî din ve, ji yê ku ew bi mîna wî ve tête biderkevtin, sîlak date bilêdan, weha divê ew 1 Mine zîv bide bidan.

Benda 204

Heger ku Jêrdestekî sîlak li hinaroka Jêrdestekî din de date bilêdan, weha divê ew 10 Şekel zîv bide bidan.

Benda 205

Heger ku Bendê Merovekî Azad sîlak li hinaroka kurê Merovekî Azad de date bilêxistin, weha divê merov guhê wî bide bijekirin.

Benda 206

Heger ku Merovekî Azad di pevçûnê de li Merovekî Azad dinî din de date bilêxistin û wî ew pê date bibirîndarîkirin, weha divê ev Merovê Azad bide bisundxwarin, „ku min ne bizanebûn ve lê dayîte bilêdan“, weha divê ew ji bona dermankirina Doktor ve bide bidan.

Benda 207

Heger ku ew di encamê birîndarîya xwe de hate bimirin, weha ew dide bisundxwarin û heger ku ew bi kurekî merovekî Azad ve bête biderkevtin, divê ew 1/2 Mine zîv bide bidan.

Benda 208

Lêbelê heger ku ew bi kurê Jêrdestekî ve bête biderkevtin, weha divê ew 1/3 Mine zîv bide bidan

Benda 209

Heger ku Merovekî Azad li keça Merovekî Azadi din de date bilêdan û ew pêre hate biberavêtin, weha divê ew ji bona beravêtina berê wê ve 10 Şekel zîv bide bidan.

Benda 210

Heger ku ev keça hanê hate bimirin, weha divê merov keça wî bide bikuştin.

Benda 211

Heger ku wî ligel keça Jêrdestekî de di rêya pêhnekê de date bikirin, ku ew berê ber xwe bide biavêtin, weha divê ew 5 Şekel zîv bide bidan.

32

Benda 212

Heger ku ev jina hanê hate bimirin, weha divê ew ½ Mine zîv bide bidan.

Benda 213

Heger ku wî li Benda Merovekî Azad de date bilêdan û wê pêre berê ber xwe date biwindakirin, weha divê ew 2 Şekelan bide bidan.

Benda 214

Heger ku ev Benda hanê hate bimirin, weha divê ew 1/3 Mine zîv bide bidan.

Benda 215

Heger ku Dektorekî ji bona Merovekî Azad ve ligel neşterekê de birîneke giran date bikirin û pêre Merovê Azad pê date bisaxkirin, yanjî wî ligel neşterê de qapaxa çavê Merovekî azad date bivekirin û pêre wî çavê Merovê Azad date bisaxkirin, weha divê ew ji bona vêna ve 10 Şekelan bide biwergirtin.

Benda 216

Heger ku ew bi kurê yekekî Jêrdest ve bête biderkevtin, weha divê ew 5 Şekel zîv bide biwergirtin.

Benda 217

Heger ku ew bi Bendê Merovekî Azad ve bête biderkevtin, weha divê li ser Xwedîyê Bende de ku ew 2 Şekelan ji bona Dektor ve bide bidan.

Benda 218

Heger ku Dektorekî ji bona Merovekî Azad ve ligel neşterê de birîneke giran pê date bigihandin û Merovê Azad pê hate bimirin, yanjî ku wî

qapaxa çavê Merovekî Azad date bivekirin û wî çavê Merovê Azad pê date bixerakirin, weha divê merov destê wî bide bijêkirin.

Benda 219

Heger ku Dektorekî ji bona Bendeyê Merovekî Azad ve ligel neşterê ve birîneke giran pê date bigihandin û ew pê hate bimirin, weha divê ew Bendeyekî ji dêlva Bendeyekî ve bide bidanîn.

Benda 220

Heger ku wî qapaxa çavê wî bi neştirê ve date bivekirin û wî pêre çavê wî date bixerabkirin, weha divê ew bi zîv ve nîvî ji buhayê kirina wîna ve bide bidan.

Benda 221

Heger ku Dektorekî hestîyên şikestiyên Merovekî Azad datin bisaxkirin û yanjî ku wî reheke nexweş date bisaxirin, Weha divê li ser Birindar de ku ew ji bona Dektor ve 5 Şekel zîv ve bide bidan.

Benda 222

Heger ku ew bi kurê Jêrdestekî ve bête biderkevtin, weha divê ew 3 Şekel zîv bide bidan.

Benda 223

Heger ku ew bi Bendê Merovekî Azad ve bête biderkevtin, weha divê Xwedîye Bende ji bona Doktor ve 2 Şekel zîv bide bidan.

33

Benda 224

Heger ku Dektorekî dewaran yanjî keran ji bona gayekî yanjî kerekê ve birîneke giran date bikirin û pê ew date bisaxkirin, weha divê ku xwedîyê ga yanjî ker 1/6 ji buhayê kirînê ve bi zîv ve ji bona Dektor ve bi nala kiryawî ve pê bide bidan.

Benda 225

Heger ku wî ji bona gayekî yanjî kerekî ve birîneke giran pê date bigihandin û ew pê hate bimirin, weha divê ew ji bona xwedî ve ¼ ji buhayê kirinê ve bide bidan.

Benda 226

Heger ku Deqvanekî deqa Bendeyekî bi bêdestûra xwedîyê wî ve deqa bendîtîya wî date bihilanîn, weha divê merov destê wî bide bijêkirin.

Benda 227

Heger ku Merovekî Azad Deqvanek date bixapandin û wî deqa Bendê ne yê wî date bihilanîn, weha divê merov vî Merovê Azad bide bikuştin û wî li ber deriyê wî de bide bihelwestandin; Deqvan divê bide bisundxwarin: „ku min bi zanebûn ve nedaye bihilanîn“ û ew bi bêguneh ve jê tête biderkevtin.

Benda 228

Heger ku hostekî avanyê ji bona Merovekî Azad ve xanîyek date biavakirin, weha divê ew ji bona her 36 gazên bingehê perçê xanî ve 2 Şekel zîv bi nala kirêh ve ji bona wîna ve bide bidan.

Benda 229

Heger ku hosteyekî avanyê ji bona Merovekî Azad ve xanîyek date biavakirin, lêbelê wî karê xwe ne bi başî ve daye biserûberkirin û ew xanîyê, ji yê ku wî dabû biavakirin, hate bihelweşandin û wî pêre xwedîyê xanî pê date bikuştin, weha divê merov vî hostê avanyê bide bikuştin.

Benda 230

Heger ku wî pê kurê xwedîyê xanî date bikuştin, weha divê merov kurê vî hosteyê avanyê bide bikuştin.

Benda 231

Heger ku wî pê bendeyekî xwedîyê xanî date bikuştin, weha divê ew ji bona xwedîyê xanî ve bendeyekî bi nala bendeyê xwedîyê xanî ve pê bide bidan.

Benda 232

Heger ku wî maldarî date binabûdkirin, weha divê ew hemûyi ji dêl ve bide bidanîn, ji yê ku wî dabû binabûdîkirin; wehajî divê ew careke din xanî bi perên xwe ve bide biavakirin, jiber ku wî xanî, ji yê ku wi ew dabû biavakirin, ne bi têrbûna xurtbûnê ve dabû biavakirin û jibervêjî ve ew hate bihelweşandin.

Benda 233

Heger ku hosteyekî avanyê ji bona Merovekî Azad ve xanîyek date biavakirin, lêbelê wî karê xwe ne li gora rêzanên hunera xwe de dayîte bikirin û pêre diwarek bi xwarî ve hatîye bidanîn, weha divê li ser vî hostê avanyê de vî diwarê hanê careke din bi perên xwe ve bide birastkirin.

34

Benda 234

Heger ku Qeyikvanekî qeyikek ji bona Merovekî Azad bi firehbûna 18000 Kor ve date biavakirin, weha divê ew ji bona wîna ve 2 Şekel ji bona kirya wî ve pê bide bidan.

Benda 235

Heger ku Qeyikvanekî qeyikek ji bona Merovekî Azad date biavakirin, lêbelê wî pêre karê xwe ne bi başî ve daye biserûberkirin û hêjî di nava vê sala hanê de vê qeyika hanê xwe date bixwarkirin û ziyan pê hate bikevtin, weha divê ew vê qeyika hanê ji hevdû ve bide bivexistin û ew bi malê xwe ve wê bide bixurtkirin û bibaşkirin û ew divê qeyika başkirî û xurtkirî ji bona xwedîyê wê ve bide bidan.

Benda 236

Heger ku Merovekî Azad qeyika xwe ji bona qeyikvanekî ve bi kirêh ve date bidan û qeyikvan bi tembel ve dihate biderkevtin û qeyik hate bibinavkirin yanjî binabûdkirin, weha divê qeyikvan ji dêlva qeyikê ve ji bona xwedîyê qeyikê ve bide bidan.

Benda 237

Heger ku Merovekî Azad qeyikvanek û qeyikek bi kirêh ve date bigirtin û wî ew bi dexilûdan, hiryê, rûn, xurma û hemû tiştên din ve date bibarkirin, ev qeyikvanê hanê bi tembel ve dihate biderkevtin û qeyik hate bibinavkirin, wehajî pêre navroka wê hate binabûdkirin, weha divê qeyikvan ji dêlva qeyikê ve, ji ya ku wî ew dabû bibinavkirin û ji bona hemûyê ve, çiyê ku wî ji navroka wêna ve dabû bi nabûdkirin, bide bidan.

Benda 238

Heger ku qeyikvanekî qeyika Merovekî Azad date bibinavkirin, di pişt re wî ew ji binê avê ve date bibilindkirin û wî ew date biçakkirin, weha divê ew bi zîv ve nîfê buhayê kirîna wêna bide bidan.

Benda 239

Heger ku Merovekî Azad qeyikvanekî bi kirêh ve bide bigirtin, weha ew ji bona wîna ve her sal 6 kor dexilûdan jêre dide bidan.

Benda 240

Heger ku serê qeyikekê li qeyekeke paç de hate bikevtin û ew hate bibinavkirin, Weha divê xwedîyê qeyikê hemûyê, ji bona yê ku qeyika wîna hatibû bibinavkirin, cîyê ku ew di qeyîka wîna de hatibû biwindakirin, li ber Xwedan de pê bide bisundxwarin, û xwedîyê qeyikê, ji ya ku qeyika wî qeyika din dabû bibinavkirin, ji dêlava qeyika wî û hemûyê dinî têde ve pê bide bidan.

Benda 241

Heger ku Merovekî Azad gayekî girawkirî date bibirin, weha divê ew 1/3 mine zîv

Bide bidan.

Benda 242

Heger ku Mrovekî Azad gayek ji bona salekê ve bi kirêh ve date bigirtin, weha divê ew ji bona karê ga ve 4 Korên dexilûdan bide bidan.

Benda 243

Bi nala kirêhkirina golikekî ve divê ew ji bona xwedîyê wî ve 3 koran ji dexilûdan ve bide bidan.

35

Benda 244

Heger ku Merovekî Azad gayek yanjî kerek bi kirêh ve date bigirtin û di nava zevîkî vala de şêrekî ew date bikuştin, weha ev bes û bi tenha ve bi ber pirsiyarîya xwedîyê wî ve tête biderkevtin.

Benda 245

Heger ku Merovekî Azad gayek bi kirêh ve date bigirtin û ew di rêya tembelîya wîna de yanjî di rêya lêdana wîna de hate bimirin, weha divê ew gayekî bi mîna gayê wî ve ji bona xwedîyê ga ve pê bide bidan.

Benda 246

Heger ku Merovekî Azad gayek bi kirêh ve date bigirtin û wî lingê wî date bişikenandin yanjî reha qirika wî date bijêkirin, weha divê ew ji bona xwedîyê ga ve ga bi dêlava ga ve pê bide bidan.

Benda 247

Heger ku Merovekî Azad gayek bi kirêh ve date bigirtin û wî çavê wî date bikorkirin, weha divê ew ji bona xwedîyê ga ve bi zîv ve nivê buhayê kirîna wîna bide bidan.

Benda 248

Heger ku Merovekî Azad gayek bi kirêh ve date bigirtin û wî quloçên wî datin bişikenadin, terya wî date bijêkirin yanjî xirê wî date bibirîn, weha divê ew ¼ ji zîv ve ji buhayê kirîna wîna ve bide bidan.

Benda 249

Heger ku Merovekî Azad gayek bi kirêh ve date bigirtin, lêbelê Xwedê lê date bixistin û ew pê hate bimirin, weha Merovê Azad bi Xwedan ve dide bisundxwarin, ji yê ku wî ga dabû bikirêhkirin, vêca ew bi bêguneh ve tête biderkevtin.

Benda 250

Gava ku gayek di çûna xwe de li şeqamekê de li binguhê Merovekî Azad ve hate bikevtin û pêre ew pê hate bikuştin, weha ev gilîyê hanê bi tu gilîyê mafeyî ve nayête biderkevtin.

Benda 251

Heger ku gayê Merovekî Azad bi poşvedan ve dihate biderkevtin, bi nal poşvedan ve karmendîya wîna ew dabû binasîn, lêbelê wî quloçên wî nedabûn bibirîn, gayê xwe nedabû bigirêdan, û vî gayê hanê êtir kurê Merovekî Azad date bipoşpêdan û ew pê hate bimirin, weha divê ew 1/2 mine zîv ve pê bide bidan.

Benda 252

Heger ku ew bi Bendeyê Merovekî Azad ve bête biderkevtin, weha divê ew 1/3 mine zîv pê bide bidan.

Benda 253

Heger ku Merovekî Azad Merovekî dinî Azad ji bona çavdêrîya zevîyê xwe ve date bikirêhkirin û wî ji bona wîna ve tov date sipartin, wî ji bona wîna ve ga datin bidan, da ku ew zevî bide biçandin, heger ku Merovê Azad tov yanjî êm date bidizîkirin û ev di nava destên wî de hatin bigirtin, weha divê merov destê wî bide bijêkirin.

36

Benda 254

Heger ku wî tov date bibirin û ga di rêya birçîbûnê de dane bilawazkirin, weha divê ew ducarî ji dêlva dexilûdan bide bidanîn.

Benda 255

Heger ku ga ji bona Merovekî Azad ve bi beramberî kirêh ve hate bidan yanji wî tov date bidizîkirin û li ser zevî de wî nehişt tu tişt bête bişînkirin, weha gava ku merov li ser vî Merovê Azad de vê dide bicihkirin, ew divê di dema çinînê de li ser 64 800 mitrê çargosî de 18 00 L dexilûdan bide biidan.

Benda 256

Heger ku ew tiştên ji dêlvê ve nikare bide bicihkirin, weha divê merov wî li ser vî zevîyê hanê de bi cotê gav ve bide birakişandin.

Benda 257

Heger ku Merovekî Azad Cotkarek date bikirêhgirtin, weha divê ew ji bona wîna ve 2400 l dexilûdan ji bona her salekê ve pê bide bidan.

Benda 258

Heger ku Merovekî Azad Sepanek date bikirêhgirtin, weha divê ew ji bona wîna ve 1800 l dexilûdan pê bide bidan.

Benda 259

Heger ku Merovekî Cotekî tovkirinê33 ji nava zevî ve date bidizîkirin. Weha divê ew ji bona xwedîyê cot ve 5 Sekelên zîv bide bidan.

Benda 260

Heger ku Merovekî Azad Cotekî vequlupandinê34 yanjî Cotekî verastkirinê date bidizîkirin, weha divê ew 3 Sekelên zîv bide bidan.

Benda 261

Heger ku Merovekî Azad şîvanek yanjî gavanek ji bona çêrandina dewaran yanjî pez ve date bikirêhgirtin, weha divê ew ji bona wîna ve hersal 2400 l dexilûdan bide bidan.

Benda 262

Heger ku Merovekî Azad gayek yanjî pezek ji bona (…); (bi dû ve valabûnek ji 6 rêzan ve tête biderkevtin).

Benda 263

Heger ku Merovekî Azad gayek yanjî pezek, ji ya ku ew jêre hatbû bidan, hate bimirin, weha divê ew ji bona xwedî ve ji dêlvê ve gayekî bi mîna gayê wî ve, pezekê bi mîna peza wî ve bide bidan.

Benda 264

Heger ku wî ji bona gavanekî yanjî şivanekî ve dewar yanjî pez ji bona çêrandinê ve datin bidan û wî tevaya kirya xwe date biwergirtin û ew bi dilê xwe ve dihate biderkevtin, dawar hatin bikêmkirin, pez hatin bikêmkirin, zayîn hate bikêmkirin, weha divê ew li gora mercên girêdana peymana xwe jî de bêtirbûnê û qazancê bide bidan.

33 Saatpflug: Plough: Cotekî tovkirinê, Hûruba, Cot.

34 Ev rengên Cotkirinan li Babil de hêjî tanî sedsalê şazdehên zayînê ew li Ewropa de nedihatin bidîtin. Cuma

Benda 265

Heger ku wî ji bona gavanekî yanjî şivanekî ve dewar yanjî pez ji bona çêrandinê ve datin bidan, wî ew datin bibirin û nîşana xwedîyê cenaweran date bihilanîn, wehajî wî ew bi zîv ve dane bifiroştin, weha divê merov vê li ser wî de bide bicihkirin, ew divê ji bona xwedîyê ga û pez ve, ji yê ku ew jê hatine bidizikirin, bi dehcarî ve bide bidan.

Benda 266

Heger ku di nava kerikî de nexweşîyek hate bipêkevtin yanjî şêrekî hinek dane bikuştin, weha divê şivan li ber Xwedan de bi bêgunehbûna xwe ve bide bisundxwarin, ziyana cenawerên kevtî ji kerî ve ji bona xwedîyê cenaweran ve tête bivegerandin.

Benda 267

Heger ku şivan yanjî gavan bi tembel ve dihate biderkevtin û di nava kerî de nexweşî hişt bête bipêkevtin, divê şivan zîyana saxbûna nexweşîya vêkevtî, ji ya ku wî ew di nava kerî de hişt bête bipêvkevtin, di nava dewaran û pêz de bide bidan û ew divê wan ji bona xwedîyên wan ve bi jimara berê ve bide bivezivirandin.

Benda 268

Heger ku Merovekî Azad gayekî ji bona cencerekirinê ve date bikirêhgirtin, weha divê ew 2 L dexilûdan ji bona vê ve bide bidan.

Benda 269

Heger ku ew kerekî ji bona cencekirinê ve date bikirêhgirtin, weha ew divê1 L dexilûdan ji bona vê ve bide bidan.

Benda 270

Heger ku wî nêrîyek ji bona cencekirinê ve date bikirêhgirtin, weha divê ew 1/10 L dexilûdan ji bona vê ve bide bidan.

Benda 271

Heger ku meroveki Azad gayek, gurîzak û gurîzvanek date bikirêhgirtin, Weha divê ew ji bona her rojekê ve 3 Şêfilênên dexilûdan ji bona vê ve bide bidan.

Benda 272

Heger ku Merovekî Azad gurîzak bes û bi tenha ve ji xwe re date bikirêhkirin, weha divê ew ji bona her rojekê ve 4 L dexilûdan ji bona vê ve bide bidan.

Benda 273

Heger ku Merovekî Azad karkerek date bikirêhgirtin, weha divê ew ji pêşîya pêşîyî destpêkirina salê ve tanî meha pêncan 5 Gran zîv ji bona her rojekê ve, ji meha şeşan ve tanî dawîya salê ve 5 Gran zîv ji bona her rojekê ve pê bide bidan.

Benda 274

Heger ku Merovekî Azad Destkarek date bikirêhgirtin, divê ew bi nala kirêh ve ji bona wîna ve (…) 5 Gran zîv,

(bi nala kirya Seyandvanekî kelpîçan ve(?) 5 (?) Gran zîv,

(bi nala kirya Tevinvanekî Qinebê ve(?) (… Gran) ziv.

(bi nala (Birîvanê) kelpîçan ve) (…) Gran) zîv,

(bi nala kirya Zêrkerekî ve (?) (…) Gran zîv,

(bi nala kirya Hesingerekî ve (?) (… Gran zîv),

38

(bi nala kirya Dartaşekî ve 4 (?) Gran zîv,

(bi nala kirya Çermvanekî ve (…) Gran zîv),

(bi nala kirya Lûlevanekî ve (…) Gran zîv),

(bi nala kirya Hosteyekî Avanyê ve (…) Gran zîv

(ji bona) 1 (rojê de) bide bidan.

Benda 275

Heger ku Merovekî Azad qeyikek date bikirêhkirin, weha divê ew her rojê 3 Gran zîv ji bona kirya wê ve bide bidan.

Benda 276

Heger ku Merovekî Azad qeyekeke barkêşîyê date bikirêhkirin, weha divê ew her rojê 2 Gran zîv ji bona kirya wê ve bide bidan.

Benda 277

Heger ku Merovekî Azad qeyekek bi hilgirtina 18 000 L (firehbûna nava wê) ve date bikirêhkirin, weha divê ew ji bona rojekê ve 1/6 (Sekel) bi nala kirya wêna ve bide bidan.

Benda 278

Heger ku Merovekî Azad Bendek nêr yanjî mê date bikirîn û ew yanjî ewaya, berî ku mehek bi carekê ve bête bidawîkirin, bi nexwşîyeke vegirtî ve hate bikevtin, weha ew wî yanjî wê ji bona Firoştdar ve dide bivezîvirandin, û Kirîdar zîv careke din ji xwe re dide biwergirtin, ji yê ku wî ew dabû bidan.

Benda 279

Heger ku Merovekî Azad Bendek nêr yanjî mê date bikirîn, û ew ji bal yekî sêyem ve hatin bixwestin, weha divê Firoştdarê wan ji bona Daxwazvanê Sêyem pera bide bidan.

Benda 280

Heger ku Merovekî Azad di nava welatekî bêgane de Bendekî nêr yanjî mêyî merovekî date bikirîn û gava ku ew ji bona nava welatê xwe ve hate bivezîvirandin, Xwedîyê Bendê nêr yanjî mê Bendê xwe yanjî Benda xwe

date binaskirin, heger ku ev Bendê hanê yanjî ev Benda hanê bi zarokên welêt ve bêtin biderkevtin, weha dê ew bi bê zîve bêtin biazadkirin.

Benda 281

Heger ku ew bi zarokên welatekî din ve bêtin biderkevtin, weha Kirîdar bi kirîna ziv ve li ber Xwedan de dide bisundxwarin, ji yê ku wî ew dabû bidan û Xwedîyê Bende yanjî Bendê wî zîvî ji bona Bazirgan ve dide bidan, ji yê ku wî ew dabû bidan û ew Bendê xwe yanjî Benda xwe dide bibirin.

Benda 282

Heger ku bendeyekî ji bona Mîrzayê xwe ve date bigotin: „ku tu ne bi Mîrzayê min ve tête biderkevtin, weha divê merov vêna ji bona wîna ve bide bicihkirin, ku ew bi nala bendê wî ve tête biderkevtin, û Mîrzayê wî divê guhê wî bide bijêkirin.

Wergerandina vê nivîsta hanê di roja 07. 03. 12 de, demjimara 08:44 de hatîye bidawîkirin.

Navrok

Kurtîya jîna min di nava çend rêz û dêran de 2
Pêşgotina werger 4
Qanûnên Hemorabî 8

**

LI SER RÊYA AZADÎYA KURDISTANÊ DE

Naunîşan: Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Nivîskar: Dr. M.S. Cuma
Çapa yekem: Kurdî - Kurdmancî - ı999
Çapxana: Rewşenbirî - Hewlêr - Kurdistan
Dane: 1000

Ley~wt: Govend M.H- Berig: Ṣerdem
Mafeyê Çapkirinêparastîye - 1999-
Jimara spardinê (1 ı ı) li sala ı999
Rêza Barzanî ji Nivîstên Kurdî ı7
Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
-Çend bîr ûbawerî li ser hin rûdanên siyasî de
ji sala 1956 - 1975 de-
Dr. M.S. Cuma
Navrok
peşgotın 3
Derîyê Yekeın
Pêkhatina Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de 14
Rûdanên li Misrê de .26
Pêkhatîna Partîya Demokratî Kurd li Suryê de 30
Raperîna Ciwanrû li Kurdistana Iranê de 87
Derîyê Duwem
Rudanên siyasî ji vêkevtina Şûreşa Ilulê sala 1961 - 1970 de 93
Siyaseta Qasim beramberî Kurd û Destpêkirina Şer.. 93
Wergêrkirina Basîyan di 8. 2. 1963 102
Hatina Abdul- Selam Arif ji bona ser Sedarîyê .l24
Hatina Arifê Duwem û girêdana peymana 29 axlêva sala 1966 de .. 13 ı
Hatina Basiyan careke din ji bona ser Serdarîyê .l52
Derîyê Sêyem
Rudanên siyasî ji Peymana 1ıavdara sala 1970 tanî sala 1975 de .. 164
Peymana 6 Avdarê .2~0
Bi dawî hatina Şûreşê ve 295
Hêjakirineke rexneyî li ser helwesta Barzanî de ji bona bi dawîanîna
vê şureşa hanê ve

-Ev ji bona Nivîsta Duwem hatîye bihitin-
Kanîyên bi karanînê ve 297
"Miletekî azad miletekî din nade bijêrdestkirin'
3
"Miletekî azad miletekî din nade bijêrdestkirin"
KarlMarx
Pêşgotin
Min ji mêj de didate bixwestin, ku ez li ser rûdanên siyasî de di nava welatê me de ji sala 1956 de tanî vê roja meyî neha de bidim binivîsandin; belam min di pêşî de date bixwestin, ku ez demeke nîşankirî ji deh salan de li ser sê berên cudan de bi zimanê me ve di warê wergerandinê de bidim binivîsandin; jiber ku hemû pêşkevtina miletan di warê zanistî û zanebûnê de di pêşî de di rêya wergerandinê de dayite bidestpêkirin.
Jiber ku ez tevaya karê xwe di şiyarkirinê de didim bidîtin; jibervêjî ve min di pêşî de ji bona pêşvexistina zimanê me û bi taybetî ve ji bona pêşvexistina zaravayê kurmancî date bikarkirin, jiber ku ev zaravaya hanê mîna tevaya zaravayên din her û her ji bal dagîrgerên Kurdistanê de di her gavê de dihate bişerkirin û rê li ber de dihate bigirtin. Herwehajî Dujminên me bi her navekî jî ve her û her wan didatin bikarkirin, ku ew mêjûwa me him ji nava serên me û himjî ji nava bextên me bi carekê ve bidin biderxistin û wê li ber çavên me him bidin bitarîkirin û himjî bidin bireşkirin û bes û bi tenha xwe ve mêjûwa xwe li ber dil û çavên me bidin bişêrînkirin û bi vî rengê hanê ve û bi hisanî ve bi saya jîbirkirina ziman û mêjûwa me ve bi xişkayî û xweşkayî ve me di nava xwe de bidin bijavkirin. Weha min di warê duwem de di wergerandinên xwe de giranîya xwe ji bona ser wergerandina nivistên li ser mêjûwa me de ji bona zimanê dê,

zaravayê kurmancî date bixistin. Di qonaxa sêyem de di wergerandina xwe de min hin ji giranîya xwe ji bona ser rêmanên dema vejandînê li 4Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Ewropa de date biavêtin, ku miletê me bi zimanê xweyî dê ve li ser bîr û bawerîyên dema vejandinê de bête biagehdarîkirin; jiber ku ew bi bingehê tevaya vejandina Ewropa ve hatine biderkevtin û li ser bingehên wan remanên hanê de tevaya pêşkevtina Ewropa û Cihana Nuh -Emerîka- têtе biavakirin. Min hemû nivîstên di bernameya wergerandina xwe de ji bil nivîsta Komara Eflaton, nivîsat Syasetê ji bal Aristo û Girava Nigaşî ji bal Tomas Mor de dane biwergerandin. Min nikarîbûn ev nivîstên hanê di dema nîşankirî de bidana biwergerandin; jiber ku min di wê navê de çar nivîs tên Mesud Barzanî datin biwergerandin. Min di vê pêla wergerandinê de ev nivîstên hanê dane biwergerandîn, ji yên ku ew li ser CD. Rom de hatine biçapkirin; jiber hinêndin jî têtin bidîtin, ji yên ku hêjî ew hatine bi çapkirin û bibelavkirin; lêbelê ew li CD. Rom de jiber kêmbûna demê ew hêjî nehatine binivîsadin. Ew jî evin: 1. Manefêsta Partîya Komonist, 1. Mêjûwa Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de û 3. Li ser Tirba Şêro de. Dê ez wanjîji nû ve li CD. Rom de bidim binivîsandin:
Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd
1931-1958
Mesud Barzanî
Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd
1958-1961
Mesud Barzanî
Kurtîyeke Mêjûwa Kurd û Kurdistanê
Ji Destpêkirina Mêjûwê Tanî vê Rojê
Mohemed Emîn Zekî Beg

Mêjûwa Dewlet Û Mîrneşînîyên Kurd Di Pêla Musulmantîyê De
-Bergê Duwem Ji Kurtîya Mêjûwa Kurd ÛKurdistan-
Mohemed Emîn Zeki Beg
Pirsiyarîya Kurd
Mêjûwa Kurdan û Neha Wan
5
)Civata Xweyîbûnî Kurdîyî Welatperwer(
-Belavoka Pêncem-
Dr. Bilêc Şêrkoh
Kurd
Rûnkirin û Dîtin
Kurd Nevîyên Mîdîyan
V. F. Mînoriskî
Kurdistana Turkî di Navbera Herdu Cengan de
Profisor A. Hesretyan
Der Barê Sitratîcîya Siyasî û Sipahî ya
.Tevgera Welatîyî Kurd
-Temaşekirinek ji bona Mêj û Neha, herwehajî yekeke din ji bona Ayinde jî de-
DoktorIsmet Şerîf Wanlî
Zanistîya Mêjûwê li Ewropa de, Felsefa wê, Şêweyê wê, Pêşkevtina wêna, Rûnkirinên li ser Mêjûwa Kurdistanê û Dîroknivîsandina Rojhilatê de
Doktor Ismet Şerîf Wanlî
Tevgera Kurd di serdema nuh û neha de
Akadimiya Zanistîya Yeketîya Sovyêtê û Akadimiya Zanistiya Ermeniya Sovyêtê; Mosko, di sala 1987 de
Mîr

Nikolo Mikavili
Peymana Civakî
Jean-Jacques Rousseau
Pêşkevtina Sosyalistîyê ji Otopîyê tanî Zanistîyê
Friedrich Engels
Rola Kar di Veguhertina Meymûnan de ji bona Merovan
6Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Friedrich Engels
Derbarê Mafeyê Netewan di Nîşankirina Çarenûsa xwe de
Lenin
Sê Kanî û Sê Pêkhatin ên Markisistîyê
Lenin
Zîneta Zimanî di nava Heremên Kurdî de
R. 1. Tissabolov
Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
-Çend bîr û bawerî li ser hin rudanên siyasîyî de ji sala 1956 - 1975 de-
Dr. M. S. Cuma
Herrwehajî min di sala 1966 de namilkeyek di bin nav û niana:
Li ser tirba pêro de date bibelavkirin
Herwehajî min Manêsta Partîya komunist ji bal Karl Marx-friedrich Engels de di sala 1975 de ji bona zimanê Kurdî zaravayê kurmancî date biwergerandin û ew di weanên Ronahî de di sala 1976 de hate biçapkirin.
Herwehajî min di gelaveja sala 1986 de: Sî sal mêjûwa Komela Xwendevên Kurd li Ewropa date binivîsandin. Ew ji bal Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de di gelavêja sala 1986 de li bajarê Berlina Rojava de hate biçapkirin.

7

Weha bi vî corê hanê ve bernameya minî wergerandinê bi dawîya xwe ve hate bihatin û ji neha û pêve bigir bes û bi tenha ve dê ez li ser hin ji wan rûdanê siyasî de ji pêla sala ı956 tanî neha de pêl bi pêl ve bidim binivîsandin.

Ez dixwazim van pêlên hanê di nava sê nivîstan de bidim binivîsandin. Herwehajî ez dixwazim nivîsteke bi taybetî ve li ser Kurdistana Turkî de û cihê wê yî giring û giran de di çarekirina pirsa Kurd de ji bona careke din bi yekkirina Kurdistanê ve ji nû ve di rêya neft û ava wê de û pêkanain dewleteke milîyî bi serxwe ve û pêwndî û gihandina wêna ligel Yekitîya Dewletên Ewropî de di ser Turkî re û ligel wê de di nava çarçopê dewleteke Fêderalî de di ayinde de bi dûr û dirêjî ve bidim binivîsandin; jiber ku ayinda Kurd û Kurdistanê di encamê dawî de di nava Kurdistana Turkîyê de tête biderkevtin û bidîtin.

Heger ku Dewleta iraqê û Surî bi taybetî ve û Ereb bi giştî ve pirsa Kurdistanê bi şêweyekî dûrbîn û zanistî ve û li ser beıjewendîya miletê xwe de li ser bingehê pêrûniştina bi mafeyê Netewê Kurd ve di Çarenûsa wî de pê neyêtin birûniştin, bi neçarî ve û di dawîya dawî de dê serpêhatîya Ismailê Sefewî û peymana sala 1515 di navbera Kurd û Turkan de ji nû ve careke din bi şêweyekî bilindtir û baştir ve li ser bingehê Fêderalîyê de di yekkirina Kurdistanê de bi mîna berî cenga cîhanî yekem ve jiber av û nefta wê ve bête bicîanîn.

Di vî warê hanê de Dr. Ismet Şerif Wanlî pir bi zanistîyeke bilind ve û li ser serpêhatîya mêjûwê de ev rastîya pirsa Musilê di nameya xweyî vekirî de ji Lozan, di 1. 5. 1992 de ji bona Serokê dewleta Turkî Turgut Özal û Serek wezîrê wêna Sulêman Demirêl de date binivîsandin.

Divê Kurd û Ereb bi hev re wan bîr û bawerîyên wê nameya hanê ji xwe re bidin bixwedekarîkirin, da ku ew bêtir di pêwistîya çarekirina vê pirsê de li ser bingehekî zanistî de û li gora beıjewendîyên xweyî milî de bi
8Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
baştirîn şêwe ve di çarekirina wêyî demokrasî û aşîtî de li ser bingehê Fêderalîyê de bêtin biliberkevtin. Ev nameya hanê bi zimanê Elmanî ve di Kovara "Kurdistan Heute", Nr: 2/ 92, Oktober! November hatîye bibelavkirin.

Ev rastîya tirş û tal divê rep û rast ji miletê Ereb re bête bigotin, .ku talankirina dewlemendîya Kurdistanê, erebkirina wêna, kole û bendekirina miletê Kurd û qirkirina wîna dê pir bi buha ve li ser wan de bête birawestandin û dê ew di encamê dawî de pir bi zîyana wan ve bête biderkevtin. Çe . ·1dostanîya miletê Ereb ji bona miletê Kurd bi pêwist ve tête biderkevtin, weha deha bêtir dostanîya miletê Kurd ji miletê Ereb re bi pêwistir ve tête biderkevtin.

Ez hêvîdarim, ku Dilsoz, Zanevan û Zanistvanên Ereb li ber tevaya vê rastîya hanê ji xwe re bêtin biliberkevtin, da ku ew miletê xwe û miletê me ji wan destanên hanêyî hatî de bidin biparastin û hêmî dostanîyê û biratîyê di nava herdu miletan de di nava miletê Ereb û Kurd de bidin biwarkirin.

Herwehajî ez dixwazin nivîsteke bi taybetî ve li ser hoyên cudabûna di nava Barzanî û Taqimê Ibrahîm Ehmed de bi dûr û dirêjî ve û di derbasbûna demê re bidin binivîsandin.

Herwehajî ez dixwazim li ser wan amarên tomarkirî de li ser serjimara miletê Kurd de di kanîyên cudan de û li ser pêşkevtina wîyî Demografî de bidim binivîsandin; jiber ku amara serjimara Kurd jiber hoyên cudan ve ew jî bi girêkeke dijwar ve tête biderkevtin, ku ew di dijwarbûna girêka xwe de ne bi kêmê dijwarbûna girêka pirsa Kurd ne

tête biderkevtin. Min di salên şêstî û herwehajî di nava salên heftêyî de di kaniyên Komela Xwendevanên Kurd de li ser vê pirsa girêka amara serjimara Kurd de û cihê wêyî demografî de di xebata miletê Kurd de himji alîyê kêra pirbûn wê de ji bona rizgarîkirina Kurdistanê û himjî ji alîyê kêra wê de ji bona pêşvexistina Kurdistanê date binivîsandin.

Ez dixwazim li vêderê de bes û bi tenha ve berê vê bêtirbûn û pirbûna serjimara miletê Kurd ji xwendevanên xweyî giramî re bidim bitomarkirin, da ku ew piçekî bêtir him li ber tevay pêşkevtina xebata Miletê Kurd de di azadî û serxwebûna Kurdistanê de û himjî bêtir di destana miletên Rom, Ereb û Ecem de di vî warê hanê de bêtin biliberkevtin.

9

Ev Amarên darêjtî li ser amara serjimara Kurd de ji nivîsta Ismet Şerîf Wanlî de bi zimanê Ingilîzî ve: "The Revolution of Iraki Kurdistan", rûpelê 5, Pulished by the Committee for Defense of the Kurdish People s right (Kurdish Representation) April 1965 hatîye biwergirtin; jiber ku di bîr û bawerîya min de kêm kesan weha mîna Ismet Şerîf Wanlî bi zanebûn û zanistî ve di vî warê hanê de dane binivîsandin.

Min ev amara Ismet Şerîv Wanlî bi bingeh ve di sala 1965 de dayite bidin. Herwehajî min bêtirbûna serjirnra miletê Kurd carekê bi endazîya 3 % dersd tanî sala 2030 dayite bidanîn, mîna ku evaya bi endazîya navarasta bêtirbûna serjimra hemû miletên li Cihana Sêyem de li gora kanîya Yekitîya Netewan de hatîye bidanîn. Cara duwem min endazîya bêtirbûna serjimara miletê Kurd bi 3,5 % der sed bi texrnînkirî ve dayite bidanîn. Li gora bêtirbûna endazîya kanîya Yekitîya Netewan de bêtirbûna Cuhên Rojhilatî di Israil de û bêtirbûna

Hundên Sor li Emerîka de bi bêtir 4 % der sed ve tête biderkevtin. Hîç gûman têde nayêt biderkevtin, ku endazîya bêtirbûna serjimara Kurd di Kurdistanê jî de bêtir ji 3,5 % der sed de tête biderkevtin, lêbelê ez dixwazim herdu endazên bêtirbûnê him 3 û himjî 3,5 % der sed bidim bidanîn, da ku Xwendevan bes û bi tenha ve berê pêşkevtina bêtirbûna serjimara miletê Kurd tanî sala 2030 bi texmîn ve ji xwe re bidin bidîtin; jiber ku amara serjimara miletê Kurd bes û bi tenha di amareke serjimareke milî de bi rast û durust ve dikare bête biderkevtin. Ev karê min bes û bi tenha ve ne kêm û nejî bêtir berê amara bêtirbûna serjimara miletê Kurd dide biderxistin û ez didim bihêvîkirin, ku wetovjî bête biliberkevtin ı.

i Tevî, ku ez bi zimanê Firensî ve nizanim, Merov dikare ji xwe re ji lîstên vê

legerrandina hanê bide bikarkirin. Ji xwe re li vêderê bi dûr û dirêjî ve li lêgerandina

Ismet erîf Walî de bi zimanê Firensî ve: LA POPILTION KURDE, "BOMBE A RETRDEMENT ET LES EFFETS SOCIAUX ET CUL TURRELS DE LA REPRESSION

Lausanne, mars 1999 de bidin bitemaekirin. Ev lêgerandina hanê di meha gulanê de

ji min re ji bal Ismet de hatin birêkirin, tevî ku wî dixwest, ku ew wî ji min di

avdaarê de bide birêkirin. Wî ew di avdarê de ji min re dabû birêkirin; belam li ser

navnîana min ji berî deh salan de hêjî ji berî yekbûna Elmanya de dabû binardin;

jibervêjî ve ev karê hanê wetov bi derengî ve bidestêrı min hate bikevtin û min nema

10Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

Hêjîbêtir guhertineke pir giran û mezîn û pir bi kêrtir ve ji bona azadî, serxwebûn û pêşkevtina miletê me di nava kurdistanê de. tête biderkevtin, ew jî di barkirina Kurdan ji gundan ji bona nava bajaran de tête biderkevtin. Ez li ser mêjûwa vî şêweyê barkirinê de û hoyên. wêna de ne li nik miletên din de û nejî li nik miletê Kurd de li vir de; naxwazim bidin biaxivtin, lêbelê ez dixwazim bes û bi tenha ve bidim bigotin, ku berê bêtir ji 90% der sed ji milête me di nava gundan de 11 nêzîka 10 % der sed jê di nava bajaran de dihate bijîyandin, lêbê neha nêzîka 10 % der sed ji miletê me di nava gundande û 90 % der sed jê di nava bajaran de têtin biderkevtin, mîna ku ev bigir di nava hemû miletên Cîhana Sêyem de dihate biderkevtin.

Bêtirbûna serjimara Kurd bi endazîya 3% der sed ve -bi milyonan ve-

Kurdistana 1965 1970 1975 1980 1985 1990 1995 2000 2005 2030

Turkî 6,00 7,00 8,00 9,34 10,84 12,56 14,56 16,88 19,57 40,98

Iran 4,50 5,21 6,00' 7,01 8,13 9,42 10,92 12,66 14,68 30,70

Irak 2,00 2,31 2,70 3,12 3,61 4,19 4,85 5,63 6,52 13,66

Surî 0,4 0,46 0,54 0,62 0,72 0,84 0,97 1,26 1,30 2,73

Tevde 12,90 14,98 17,34 20,09 23,29 27,01 31,34 36,44 42,07 88,07

Bêtirbûna serjimara Kurd bi endazîya 3,5% der sed ve - bi milyonan ve-

Kurdistana 1965 1970 1975 1980 1985 1990 1995 2000 2005 2030

Turkî 6,0 7,13 8,46 10,05 11,94 14,18 16,84 20,00 23,75 56,14

Iran 4,5 5,34 6,35 7,54 8,95 10,63 12,63 15,00 17,81 42,10

Irak 2,0 2,37 2,82 3,35 3,98 4,73 5,61 6,67 7,92 18,71

Surî 0,4 0,48 0,56 0,67 0,79 0,94 1,12 1,33 1,58 3,74

Tevde 12,9 15,32 18,19 21,61 25,66 30,48 36.20 43,00 51,06 120,69

dikarîbû wî ji bal Fewzî Esede ji xwe re bidim biwergerandin. Ez li Kurdistana Iraqê
de bûm û ev karê hanê ji min re ji bona wêderê de hate binardin û min ew li wêderê
de ji bona wergerandin dayite bidan. Di 4. 6. 1999 de ji bona ewropa hatim
bivegerandin û wergerandina kar hêjî nehatibû bidawîkirin. Ez dê di 28. 6. 1999 de
careke din bêtim bevegerandin û ez hêvîdarim, ku dê ew karê hanê hatibe
biwergerandin.

11

toprax km2 top. %serjim. Serjimara 2000 Serjimara
Welat Kurdistan Kurd 2030
Turkî 760.000 220,000 23% 20,000,000 56,000,000
Iran 1,600,000 180,000 21% 15,000,000 42,000,000
Iraq 440,000 80,000 30% 6,700,000 18,800,000
Surî 170,000 20,000 10% 1,300,000 3,700,000
Hemû 500,000 43,000,000 120,500,000

Bi vî awayê hanê ve bernameyeke minî pir bi dûr û dirêj ve di warê nivîsandînê de li ser Kurd û Kurdistanê de têtе biderkevtin. Ez hêvdarim, ku dê .ezê wan karên hanê bikaribim bi başî ve bidim bicîanîn.

Di vê nivîsta beşê pêşî de pir danav ez li ser wan de nehatime biaxivtin, yanjî min bi şiyarbûn ve xwe ji wan dayite bivegirtin; jiber ku dibe ez di pişt re dê bi ser wan danavan ve bêtim bivegerandin, yanjî jiber ku ez dixwazim bi rastî ve xwe ji wan bidim bidûrkirin û nivîsandina li ser wan de ji hinên din re bidim bihiştin.

Ez dixwazim vê nivîsta xweyî hanê û herduwê dinî li ser vê pêla hanê de ji bona Kak Idrîs Barazanîyê Nemir bidim bidiyarîkirin. Min Idrîs Barzanî di havîna sala 1970 de di nav Pirdan de li Kongirê Heştî Partîya Demokratî Kurdistan de date binaskirin. Di wan dîtinên hanêyi de di wê demê de min pir guhê xwe bi peyvên wî ve dadatin bidan û min dixwest ku ez wî ji xwe re bidim binaskirin, belam dem pir bi kurt ve ji bona nasîna vî Rêberê Xortê Nuhhatîyî bela û livandî di tatîk û sitratîcya siyasî de û zal û peyvdar li ser têgihiştina siyasî de dihate biderkevtin.

Di 13. 3. 1979 de ez û Roj Şawiş ji Berlin di ser Pirag û Bagdadê re ji bona Tehran ji bona şûna Barzanî hatin biçûyîn. Ez naxwazim li vir de li ser çîroka xwe û Roj Şawîs de bidim biaxivtin û binivîsandin, ya ku ew pir bi tirse ve dihate biderkevtin; jiber ku balafira me li balafirxana Begdadê de hate bixerabûn; lê ez dixwazim li vir de gotinên Idrîş li ser nigerîya wan de li ser biderngkevtina gihandina balafira me de ji bona balafirxana Tehranê de bidim bivegerandin; jiber ku wan dizanîbû, ku dê balafira me di ser Bagdadê re ji bona Tehranê bête bigihandin. Piştî ku wî ez û Roj dane

12Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

bihembêzkirin, wî date bigotin: pir em li ser biderengkevtina we de -nigar û xemdarbûn. Wî tevaya xweşbûna dildarîya xwe bi hatin û dîtina me ve bi saxî ve date biderxistin.

Ji vê roja hanê û tanî mirina wîna de di 3 ı. ı. ı987 de roj bi roj ve hevaltî û dostanî di nava min û wî de dihate bixurt û bikûrkirin. Em pir ligel hevdû de li ser kûrbûna dûrbûna mîlî de û li ser siyaseta rizgarîkirina Kurdistanê de û li ser armanaca xebata Miletê Kurd de di pêkanîna dewleteke milîyî de bi serê xw ve dihatin bipeyivadin. Çend di ser van pêwendiyên min de ligel Idrîs de dem dihate

biderbaskirin, bêtir û bêtir tevaya Kesîtîya wîyî mezin û welatperwerîya wîyî bêqam di her warekî jînê de di xwendekarîya min de jê re dihate biderkevtin. Belê ew ji Derketvanê dibustana siyasîya Barzanîyî bilind ve di welatperwerîyê de û di têgihiştina jînê de dihate biderkevtin. Ew ne mîna bi Siyasetvanekî Rojholatî ve di nava welatên paşvekevtî de dihate biderkevtin, ji yên ku pir ji wan li ber siyasetê de bi gotinên ser tûran ve hêjî têtin biliberkevtin; lêbelê têgihiştina wîna di siyasetê de di taktîkê de, di sitratîcîyê de û di armanca wêna de bi têgihiştina wêrıa ve di dema vejandînê de li Ewropa de dihate -.biderkevtin. Kêm kes mîna wîna min di nava Kurdan de didate bidîtin, ji yên ku ew weha deha bi jêhatîbûn û livandî ve bi vîn û evîn ve, weha deha bi berz û bala ve di taktîk û sitratîcîya siyasîyî Kurd de di armanca wîyî bilind de ji bona serxwebûna Kurdistanê de dihatin biliberkevtin. Kêm Kes mîna wîna li ser siyasetê û serperteştîya wêna de weha bi zal û diyar ve dihatin biderkevtin. Ew zû li ber bîr û bawerîyên siyasetê de dihate bikevtin û hêjîbêtir wî bi zûtir ve û li ser bingehê hiş de ew bîr û bawerîyên siyasîyî hanê didatin bicîanîn. Wî zû Rêberên Qelp û Nezan ji Kurdan de didatin binaskirin û hêjîbêtir bi zûtir ve wî ew didatin birutûtazîkirin û di encamê dawî de wî ew didatin birûreş û birûsarîkirin. Hîç kesekî nikarîbû ew bida bixapandin, yanjî derewên wetov ligel wî de bidana bikirin, da ku ew wî bi wan ve pê bidin bixapandin. Ew bi xwedîyê peyva xwe ve beramber bi Dost û Dujminên xwe ve dihate biderkevtin. Ew bi rast û durust ve bi dostê dostên xwe ve û bi dujminê dujminên xwe ve dihate biderkevtin. Ew bi belayeke mezin ve li ser Dujmin de dihate biderkevtin. Ew ne bi qilçixekî ve, lêbelê ew bi gîsnekî ve her û her di çavên dujmnin de dihate biderkevtin; jibervêjî ve hemû Rêberên Qelp

Û Nezanên Kurd û Dujminên Kurdistanê bi carekê ve bi devavêtina xwe ve li ser Idrîs de didatin bigirêdan, mîna ku wan berê ew bi devavêtinên xwe ve li ser Barzanî de didatin bigirêdan.
Li ser van nav û nîşanê bilindî hanê de ez dixwazim ji bona vî Pêşmergê Qehreman û Rêberê Kurdistanêyî mezin di nava cerg û hinavên miletê me de vê rêza hanê ji van nivîs tan bidim bidiyarîkirin, da ku nifşên tên ji xwe re di navbera Rêberên Welatperwerên Mezin de û Rêberên Qelp û Nezan de bidin bicudakirin.
Ez ji tevaya Xwendevanan û Rexnevanan hêvîya libuhrandinê li ser her kêmanîyekê de di vê nivîsta hanê de didim bikirin. Ezê dê li ser pêşneyarekê yanjî rexneyekî ji bal Xwendevanan û rexnevanan de bêtin bidilşadkirin û dê ez bixwazim ji wan pêşneyaran û rexneyan sûd ji xwe re bidim biwergirtin.
Di dawîya dawî de ez dixwazim sipasî wan hemû Kesan bidim bikirin, ji yên ku wan hergav yarmetîya min ji bona biserkevtina vî karê hanê dane bikirin û bi taybetî ve mîna hercar ez dixwazin sipasên xweyî bi taybetî ve ji bona Fewzî Esed bidim bipêşkleşkirin, jiber ku bi saya serê wî ve ev nivîsta hanê jî hatîya birastkirin.
Dr. M. S. Cuma
Berlin, di 25.2. 1999 de

14Li ser rêya azadîya Kurdistanê de_

Derîyê Yekem

Pêkhatina Komela Xwendevanên Kurd liEwropa de

Ji 10 - 16 gelawêja sala 1956 de li bajarê Wiesbaden -Vîsbadin- de li Elemanya Federalî de Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de hate bipêkhatin. Eve demeke li ser pêkhatina vê komela hanê de hatîye biderbasbûn; lêbelê ev bi demeke kurt ve di mêjûwa merovanîyê de, di mêjûwa xebata miletan de û di mêjûwa sazmendî û rêxistanan de têtе

biderkevtin. Lêbelê ev dema hanê di mêjûwa xebata gelê Kurd de û bi taybetî ve di xebata Xwendevanên Kurd de li Ewropa de bi rûpelekî pir geş û xweş ve ji bona xebata gelê me, belê ji bona pêşvexistina vê xebata hanê di hemû warî de têtе biderkevtin. Xebata Xwendevanên Kurd li Ewropa de bi beşekî ve ji xebata hemû miletên jêrdest li seranserî cîhanê de bi dijî kevneperestîyê, serdarîya bêganê ve û herwehajî bi dijî sustêma kolonyalîyê û impiryalîyê ve têtе biderkevtin.

Di vê sala hanê de, di sala 1956 de xebat li seransî cîhanê de li Asya, Afrîqa û Emerîka Latînî de bi dijî sustêma kolonyalîyê ve hate bigeş û bigûrkirin. Herwehajî di nava welat û miletê me jî de xebat hate bigeşkirin; jiber ku xebata me bi beşekî ve ji xebata wan hemû miletan dihate biderkevtin, ji yên ku wan di wê çaxê de ji bona azadîyê, serbestîyê û serxwebûna xwe ji nava lep û pencên Beganan didatin bixebatkirin.

15

Destûra komela xwendevanên kurd li ewrûpa

Yek - Nav: Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa.

Dudo - Navrokê Komelê: Sazmendiyeke şagirtiyî pêşverû ye.

Sisê - Armancên wêyî bingehî:

-1Bi hêzkirina pêwendiyê di nava Xwendevanên kurd li Ewropa de û karkirin ji bona ji hev- vekirina pirsiyariyên wanî xwendinê yan jî yên civakî û xurtkirina canê hevkariyê, yarmetiyê û yekîtiyê di nava wan de.

-2Xurtkirin û hinerkirina pê.wendiyê û yarmetiya wekhevî di nava komela me û sazmendiyên Xwendevanên Kurdistanî ûKurdên din de ji bona xebatkirinê ji bona armancên tevgera meyî şagirtiyî hevgirtî.

-3Bi hinerkirina pêwendiyên biratîyê û yarmetiya li gelhev de di navbera endamên komela me û karker û rewşenbîrên Kurdên li Ewropa de.

-4Vejandina zanyarîya milî û welatîyê Kurd û karkirineke bi xurtî ve ji bona pirsiyarîya Kurd û beşdarbûn di xebata gelê Kurd de ji bona wergirtina mafeyê çarenûsî xwe di Kurdistan de.

-5Nasdana netewê Kurd û çandîya wî, welatê wî Kurdistan û pirsiyariya wîyî welatî bi gelên cîhanê ve.

-6Bi hêzkirina canê alîkariyê û dostaniyê di navbera Xwendevanên Kurd de li Ewropa û Xwendevanên welatên din de û pêwendîkirin li gel rêxistinên Xwendevan û ne Xwendevanan de ji yên welatî û cîhanî û hevkarî li gel wan de bi pê kara herdû aliyan ve

16Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

-7Beşdarbûn di xebata gelê Kurd û piştgirtina xebata hemû gelên dunyayê de bi dijî Imperyalîzmê, kevneperestiyê û recîmê dîktatorî ve, li pê azadiyê, demoqrasîyê û aşitiyê de li cîhanê de.

Çar - Pêwendiyên nameyî di navbera Liqan û Komîta Birêvebirina Giştî de bi kurdî ye.

Pênc - Komele Kovarekê li dûhev de bi navê Kurdistan ve derdixe, ew organa Komelê ye.

Şeş - Endametî:

-1Her Xwendevanekî Kurd yanjî Rûniştvanê kurdistan be, ku ew li Ewropa de dixwîne, dikare bi Endamê Komelê ve bête bikirin, bi mercekî ve:

a) Bi destûra Komelê razî be û ji bona bi cîh anîna armancên wê ve kar bike.

b) Abûna salan bide, li gora ku Liq wê li ser berzbûna jîndarîya welêt datîne û sînor dike.

-2Mafeyê wergirtina Endaman bes û bi tenha ve di destê Komîteya birêvebirina Giştî de ye, piştî wergirtina bawerîya Liq.
-3Eger ku Endam bi pê destûrê ve ne çû, yanjî 'karekî weha kir, ku ziyan bi Komelê ve yanjî bi gelê Kurd ve dide bigihandin, ew xwe tûşî van sizeyên xwarê dike:
a) Serenc rakişandin (inzar), sersikîn kirin (tewbîxkirin) bi biryariya Liq ve tête biderkevtin.
b) Sarkirin bi biryarîya Komîteya Birêvebirina Giştî ve tête. biderkevtin
17
c) Derkirin bi biryarîya Kongirê Giştî ve tête biderkevtin
Hevt - Rêxistina Komelê. Komele li ser van bendên jêrîn de dire:
- 1Kongirê Giştî:
a) Pêktê ji wan Endamên têde têtin biamadekirin.
b) Berztirîn desthilata destê Komelê ye. Dikare destkarîyê di destûra Komelê de bi kêmtirîn piranya dengan ve bide bikirin û di dema yekbûna wan de ew alî bi ser ve tête biserkevtin, yê ku Serekê kombûnê pişt lê dide bigirtin.
c) Salê carekê ew tête bigirtin û di dema pêwistî de dikare kongireyekî nedidema xwe de bête bigirtin, evjî li ser daxwaza du ji sisyan ji Endamên Komelê tête bikirin, yan jî du ji sisyan ji Endamên K.B.G. û di herdû caran jî de divê Endamên Komelê bi kêmanî ve mehekê berî wî bi cîh û dema Kongirê ve bêtin bizanîn.
d) Bi tenê ve K.B.G. mafeyê danîna dem û cîhê kongirê heye.
e) Pêş xwendina rapora K.B.G. ji Endamên kongirê re komîteyek ji bal kongirê de ji bona birêvebirina kombûnên kongirê tête bihelbijartin
-2Komitîya Birêvebirina Giştî:

a) Berztirîn desthilate di nava du kong iran de.
b) Pêktê ji hevt-neh Endaman û du cîhgir, ku ew xweser li kongirê de têtin bihilbijartin.
18Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
c) Ew Pişti kongire kom dibe û li wê de ji nava xwe Sekretêrê Giştî, Nêwerê wî, Hejmêrê Giştî û Sekertêrê govara Kurdistan dide bihildibjêrin.
d) Biroya Sekretariyat ji Sekretêrê Giştî, Nêwerê wî û Hejmêrê Giştî tête bipêhatin. Ew biryarên K.B.G. di nava du kombûnan de dide bicihanîn û bi kêmanî ve ji du mehan carekê ew tête bikomkirin.
e) K.B.G. bernameya kongirê dide biamadekirin û di kombûna pêşî de wê li ber Endaman de dide bidanîn.
f). K.B.G. her ji sê mehan de carekê kom dibe.
g) K.B.G. xweser bi berpirsîyar ve beramberî kongirê Giştî tête biderkevtin.
-3Desthilatiyên Sekretêrê Giştî û yên Nêwerê wî:
a) Sekretêrê Giştî nameyên Komelê mor dike.
b) Sekretêrê Giştî yanjî piranîya Endamên K.B.G. ji bona kombûnê bandikin.
c) Sekretêrê Giştî û Nêwerê wî kar û barên Komelê bi lihevkirina nav xwe ve bi rê dibin. Li kombûna yekemî sekretaryat de Sekreterê Giştî û Nêwerê wî erkê pêwendîkirinê li gel sazmendiyan û rexistinan de û herwehajî ya Liqan jî li ser xwe de didin biparvekin.
d) Di dema diyarnebûna Sekretêrê Giştî de, Nêwerê wî û hejmêrê Giştî bi erkê birêbirina kar û barên Komelê ve radibin.
-4Liq:
a) Pêktê ji Endamên Komelê li welatên Ewropî de bi biryarîya

K.B.G.
19
b) Berztirîn desthilatîya navçe ye û bi kêmanî ve salê carekê kom dibe.
c) Liq di civîna xweyî salane de komitîya xwe dide biheldibijartin.
d) Civînên kombûnan têtin binivîsandin, hejmêrtîya Liq bi rêk û pêk tête bidanîn.
-5Komitîya Liq:
a) Ji sê-pênç Endaman tête bipêkhatin û ji nava xwe Sekretêr didin bihelbijartin.
b) Kar û bar Liq dide birêvebirin û roleke mezin ji bona bi cîhanîna armanccên komelê û biryariyên K.B.G. ve di welatê tê de dide bilîztin, bi mercekî ve ku ew ji siyaseta K.B.G. neyê te biderkevtin.
Heşt- Diravîya Komelê:
l) Diravîya Komelê li vanê jêrî de tête bipêkhatin:
a) Abûnên salan
c) Yarmetîya Endam û Dostên komelê
d) Desteketinên çalakî û jêhatîbûnên Komelê.
(2Diravîya Komelê li nava kasa Liq û ya Gişтî de bi vî corî ve tête biparvekirin:
Kasa Liq bi kêmanî ve 50 % ji hatinên xwe ji bona kasa Gişтî dide bidan, beramberî vê kasa Liqan jî dikarin li gora pêwîstiyên xwe ji kasa Gişтî yarmetiyê ji xwe re bidin biwergirtin.
20Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Destûra Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de bi zimanê Ingilîzî ve:
The Constitution of the KURDISH STUDENTS SOCIETY IN EUROPE (KSSE(
Approved by the 18th congress held in W .Berlin 6-9/811976

First: name: Kurdish Students' Society in Europe.

Second: Nature of the Society: A progressive, democratic student organization,

Third. Main Aims:

-1Strengthening relations among Kurdish students in Europe, endeavoring to solve

their academic and social problems,and conso Lidating the spirit of cooperation,

mutual assistarıce and unity among them.

-2Strengthening and consolidating relations and cooperation on equal footing

between our Society and other kurdistan and Kurdish student organizations in the

service of the aims of our united -student'; .

movement.

-3consolidating the fratemal relations and mutual cooperation between members of our society and Kurdish workers and intellectuals in Europe,

-4Developing the Kurdish national and patriotic culture, exerting serious efforts in

the service of the Kurdish people's cause and their national and patriotic case, and

participating in the struggle of the

Kurdish people for their right to self-determinatiorı in their home-land kurdistan.

-5Acquainting the peoples of the world with the kurdish nation, its civilization, home-land kurdistan and its national case.

-6Strengthening cooperation and friendship between Kurdish students in Europe

and students of other countries and cooperating with the
national and international student and non-studerıt organizations for our mutual
interests.
-7Participating in the Kurdish people's struggle and supporting the struggle of all
the peoples of the world against imperialism, reaction and dictatorial regimes and
for freedom, democracy and peace.
21
Forth- All correspondence between the branches and the executive Committee is to
be in Kurdish.
Fifth- The Society publishes a periodical ca1Jed"'Kurdistan" which is the organ of
the Society.
Sixth- membership:
-1Every Kurdish student or from kurdistan studying in Europe has the right to
become a member of the Society provided that he or she:
a-Accepts the constitution and endeavors to realize the aims of the Society.
b- pays a manual fee (decided by the branch according to the level of living in. its
respective countıy.(
' -2the acceptance of applications for membership is decided by the Executive

Committee after taking the view points of the branch concemed into considration.

-3should a member violate the constitution or commit an act harrnfiıl to the Society

or the kurdish people and their liberation movement he or she became subject to

thefollowing punishment:

a) waming reprimand by a decision of the branch committee.

b) freezing bya decision of the executive committee.

c) Expulsion by a decision of the congress.

Seventh: the constitution of the society:

The society is constituted according to the foİlowing bases:

-1the congress which is

a) made up of the members attending it.

b) The highest authority in the society, it has the jurisdiction to introduce amendments to the constitution, it takes decision on the bases of simple majority and in case of a draw, the side with which the vote of the chairrnan of

the session is cast became the winning side.

c) The congress is held once a year and in ernergençies, an extra ordinary congress

can be held by a request of at least two-thirds of the members of the society 01.,'

.by the two-thirds of the members of the executive committee in both cases, all

members must be inforrned of the date and the place of the congress at least a

month in advance.

d) The executive committee only has jurisdiction to fix the place and date of
congress.
e) Before reading the report of executive committee, the congress elects from
among the participation of committee to chair the sessions.
-2the executive committee which is:
22Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
a) the highest authority between two congresses.
b) Is composed of 7-9 members and 2 stand by members elected directly by the
congress.
c) Meets after the conc\usion of the congress, during it's first meeting it elect from
among it's members and the secretary-general, deputy secretary, treasure , and
the editor of (kurdistan.(
d) The secretary is composed of secretary general his deputy and the treasure, it
implement the decision of the executive committee between two of it's meetings, and it meets at least once every two months.
e) The executive committee prepare the agenda of thecongress and present it to
the participants in it's first session.
f) The executive committee meets regularly once every three months.
g) The executive committee is directly answerable before the congress.
-3the jurisdiction of the general secretary and his deputy:
a) he signs the correspondence of the society.

b) The general secretary or the majority of the executive committee summons the
executive committee to meetings.
The general secretary and his deputy agree upon perfonning the functions of the society in the first meeting of the secretariat, the secretary general and his deputy share between themselves.
23
Kongirên Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de tanî sala 1990 de:'
Kongirê Yekem 10 - 16. 8. 1956
Kongirê Duwem 2 - 4. 1. 1958
Kongirê Sêyem 4 - 8. 8. 1958
Kongirê Çarem 23 - 28. 8. 1959
Kongirê Pêncem 22 - 26.8. 1960
Kongirê Şeşem 22 - 26.8. 1961
Kongirê Hefetem 9 - 15. 8. 1962
Kongirê Heştem 9 - 15. 8. 1963
Kongirê Nehem 3 - 9.8. 1964
Kongirê Dehem 17 - 22. 8. 1965
Kongirê Yanzdehernîn 23 - 30.8. 1966
Kongirê Duwanzdehemîn 27 - 31. 12. 1967
Kongirê Sêzdehemîn IL - 16. 8. 1969
Kongirê Çardehemîn 1 - 5. 8. 1970
Kongirê Panzdehernîn 15 - 19.2. 1972
Kongirê Şazdehemin 16 - 20.8. 1973
Kongirê Heftdehemîn 27 - 31. 8. 1975
Kongirê Heştdehemîn 5 - 9.8. 1976
Kongirê Nozdehemin 27 - 30.8. 1978
Kongirê Bîstehemîn 15 - 18.8. 1982

Kongirê Bîstûyekem 14 - 16.9. 1986
Kongirê Yekgirtinê 19 - 21. 8. 1988
Kongirê Yekgirtinêyi duwem 17 - 20. 8. 1990
li bajarê VîzbadinElmanya
li bajarê London Ingilistan
li bajarê Monîx Elmanya
li bajarê Viyena Nemsa
li Berlina Rojava
li bajarê Munster Elmanya
libajarê Birawinşivayg Elmanya
li bajarê Monîx Elmanya
li bajarê Hanover Elmanya
li Berlina Rojava
li Berlina Rojava
li bajarê Belgrad Yogsilavya
li Berlina Rojava
li bajarê Stokholm Siwêd
li bajarê Buxarêst Romanya
li Berlina Rojava
li Berlina Rojva
li Berlina Rojava
li Berlina Rojava
li Berlina Rojava
li Berlina Rojava
li Berlina Rojava'
li bajarê Giratzs Nemsa
2Ji xwe re di vî warê hanê bi dûr û dirêjî ve li namilka sî sal li ser KSSE de -Komela

Xwendevanên Kurd li Ewroda de, di ıo. 8 . 1986 ji bal Sikretarîya Komela Xwendekarên Kurd li Ewropa de,Berlina Rojava de, bidin bitemaşekiring, ya ku ew'
ji bal min de bi zimanê Kurdî Zaravayê kurmancî hatibû binivîsandin.
3Careke din ji nû ve yekitî di Komela Xwendevanên Kurd de li Ewropa de di
navbera Partî û Hevalên Celal Talebanî de hate bikirin, piştî ku ewe di sala 1975 de
ji Komelê ligel Hevalên Selah Bedredîn de hatin biderkevtin û wan Komelek nuh di
Baxê Cenweran de li Bajarê Berlina Rojava de bi amadebûna Celal Talebanî de bi
dijî Komela ve dane bidurustkirin.
24Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Kongirê Yekgirtinêyî duwem bi kongirê dawîyê Komela me ve tête biderkevtin.
Ez ji Kongirê Pênc li bajarê Berlin de di sala ı960 tanî
Kongirêyî dawîyî vê komele hanê de li bajarê Giratz li Nemsa de der sala ı990 di tevan de hatim bibeşdarîkirin û yekek ji Endamên Komelêyî jêhatî têde dihatim biderkevtin. Jîna minî siyasî di nava kar û barên Komelê û Rêxistina Partî Demokratî Kurdistan de di Ewropa de bi jêhatîbûn ve dihate biderkevtin. Ez hêvîdarim, ku ez dê rojekê li ser wan rojên; ,"'eş û geş de di jîna xwe de bidim binivîsandin û pêerjî piçekî bi dûr û dirêjî jî ve him li ser Komela Xwendevanên Kurd de li Ewropa de û himjî ligel jî de li ser Rêxistina Partîya Demokratî Kurdistan de li Ewropa de bidim binivîsandin; belkî piçekî Keç û Xortên Kurd ji mêjûwa herd u rêxistinan ji xwe re sûd bidin biwergirtin û hêjîbêtir piçekî li ser mêjûwa xebata Xwendevanên Kurd

de li Ewropa de bêtin biagehdarîkirin, bê kanî wan çilo û çawan û di bin çi merc û zînetan de ji bona welat û miletê xwe didatin bixebatkirin. Ez ji nehan de belgeyan ji bona nivîsandina vî karê hanê didim bikomkirin.

Ez ji sersala ı968 de di Kongirê Duwanzdehemîn de li Belgirad de li Yogsilavya de tanî Kongirê Panzdehemîn li Buxarêst de li Romanya de der sala ı972 de û ji Kongirê Heftdehemîn de li bajarê Berlîna rojava de di sala ı975 de tanî Gongirê Nozdehîn li bajarê Berlin de der sala ı987 de bi Endamê Sikretarîya Komela Xwendevanên Kurd ve dihatim biderkevtin û di hemû biryar û derkirinên Komelê de bi jêhatîbûn ve dihatim bibeşdarîkirin; jiber ku Sikretarîya Komela Xwendevanên Kurd bi pirbûn ve ji sê Kesan ve dihate bipêkahtin û ew di navbera du civînên Komîtiya Birêvebirina Giştî ve ya Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de bi hemû kar û barên Komelê ve dihate birabûn û wê siyaseta Komelê di hemû warekî de di wê pêlê de didate biacîanin. Hergav ez di wir de bi Wênerê partîya Demokratî Kurdisan ve dihatin biderkevtin.

Divê li vêderê de bête bigotin, ku pir Biraderên din jî di birêvebirina siyaseta komelê de di Kornitîya Birêvebirina Giştî ve û herwehajî di Sikretarîya wê de pir bijêhatîbûn dihatin bibeşdarîkirin û

ew bi wênerên sazmendî Û partîyên xwe ve dihatin biderkevtin, yanjî ku ew bi bêlayan ve dihatin biderkevtin.

Me tevan bi carekê ve pir bi canekî bilindî siyasîyî welatperwer û demokratî ve li ser bingehê kamasîya siyasî de ji bona kara welat û miletê xwe de ligelhevdû de didate bikarkirin, hegerjî cudabûnên bîr û berwerîyan jî di nava me jî de bihata biderkevtin, ew hergav bi şêweyekî demokrasî û bajaratî ve li ser bingehên armancên Komela

Xwendevanên Kurd de li Ewropa de dihatin biçarekirin; jiber ku tevaya Komela me li Ewropa de li se wî canê dimokrasîyî hanê de hatibû biavakirin û wê hergav jî wisa di hemû karên xwe de didate bireftarîkirin. Bi rastî ve Komela Xwendevanên Kurd ji roja pêkhatina xwe de li ser wê remana demokrasîyî bilind de hatibû biavakirin û hergav jî ew li ser wê de dihate biçûyîn. Ev başîya hanê jî bi rastî ve ji bona wan Merovan re tête bivegerandin, ji yên ku wan di roja pêşî de Komela Xwendevanên kurd li Ewropa de dabûn bidamezirandin. Ew reftra wan ji bona me tevan bi nimûne ve dihate biderkevtin. Rojekê ji rojan tevî hemû cudabûnên renamî û siyasî jî di nava Komela me de ew rêbazê demokrasî her û her ji bal hemû Endamên Komelê de dihate biparastin. Ev jî bi hoyê bingehîyî pêşkevtina Komela me ve her û her dihate biderkevtin û cihê wê bi hêjabûn ve him di nava miletê me de, di nava rêzên Xwendevanên Navnetewî de û himjî di nava bîr û bawerîya cîhanê jî de dihate biderkevtin.

26Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

Rûdanên li Misrê de

Di sala 1956 de bûyîn û veguhertinên giran û mezin li seranserî cihanê de dihatin bikirin. Di vê sala hanê de bi kurtî ve di piştî pêkhatina Komela Xwendevanên Kurd de li Ewropa de xebata miletê Misrî hate bigeş û bigûrkirin. Impiryalizmê û bi taybetî ve impiryalizma Ingilîzî û Firensî bi alîkarîya leşkerîyî Israilî ve hêrîşeke sê qolîyî mezin ji bona ser Misrê datin bidadan,da ku ew careke din ji nû ve Misrê ji bona jêrdestîya xwe bidin bivegerandin û agirê xebata rizgarîkirinê li Afrîqaya û Rojhilata Navînî de bidin bitemirandin.

Lêbelê bi saya xebata miletê Misrî ve û herwehajî bi saya alîkarîya dewleta Sovyet ve impiryalizma Ingilîzî û Firensî û pêrejî leşkerîya Israilî jî ketineke mezin ji xwe re datin bixwarin. Belê ev

kevtina hanê di cara pêşî de di mêjûwa impiryalizma Ingilîzî de hate biderkevtin, ku bi neçarî ve ligel Hevalbendên xwe divabûn xwe ji Misrê bidin bikişandin. Wehajî li seranserî cîhanê de Impiryalizma Ingilîzî û Firensî piştî bi dirêjbûna sedsalan ve dest bi herifandina xwe ve datin bikirin, piştî ku roj di nava wan de nedihta biavakirin.
Vê guhertina hanê di dunyayê de di cara pêşî de di sala 1917 de date bidestpêkirin, gava ku şûreşa Oktobera mezina li Rusya de hate biserkevtin, ya ku têde yek ji şeşem ji ser ûwê zemînê de hate biazadîkirin û herwehajî pêrejî wê şûreşa mezin ji bona bi yekkirina miletên Jêrdest û çînîya Karger ve date bibangkirin, da ku ew bi hev re bi dijî kolonyalizmê, impiryalizmê û kevneperestîyê ve bidin bitêkoşînkirin. Vê şûreşa Oktoberî mezin, ya ku ew li rusya de hate bivêkevtin, dergehekî pirî mezinî hêvîyê li ber miletên Jêrdest de li seranserî cîhanê de date bivekirin û herifandina sustêma kolonyalîyê û împiryaliyê date bidestpêkirin. Zengilê azadîyê, serxwebûnê û

pêşkevtinê di nava hemû wan welt Û miletên tamarkirî de di nava sedsalên navînî de hêdî hêdî lêbelê bi xurtî ve ji bona şiyarbûn û vejandina miletan ji nava evsanan de didate bilêdan.
Şûreşa Firensî tevaya miletên Ewropa ji tamara sedsalên navînî de date bişiyarîkirin û birizgarîkirin û serên Padîşahên wanî gen û genî bi gogê ve li ber kaşoyê Napolyon de date bidanîn û bimalandin.
Şûreşa Oktoberî mezin tevay sustêma derebegîyê, kolonyalîyê û impiryalîyê di nava welat û miletên Jêrdest de date bitarûmarkirin.
Piştî cenga cîhanî yekem û bi xurtbûna dewleta Sovyêtî ve pêrejî herwehajî tevaya xebata miletên Rojhilat û miletên din di seranserî dunyayê de hate bigeşkirin", Hewehajî pêrejî xebata miletê Kurdistanêyî belengaz jî hate bigeşkirin.

Lêbelê Impiryalîyê careke din ji nû ve ji bona parverkirina dunyayê ji miletên Jêdest ve di navbera xwe de tevaya merovanîyê di sala 1939 de ji bona nava tenûra cenga man û nemanê, ji bona nava cenga cîhanî duwem date biavêtin û impiryalî li ser kelexên hevdû de bi pîxîla hevdû ve hatin bikevtin.

Di 22.6. Sala 1941 de dewleta Elmanîyî Nazî hêrîşeke giranîyî mezin ji bona ser Sovyêtê date bibirin, da ku ew wê ji ser rûwê zemînê de bide bihilanîn û miletên Sovyêtî ji xwe re bide bibendekirin. Lêbelê dewleta Sovyêtê bi mêrxasî ve, bi qehremanî û lehengî ve rû li rû de bi beramberî Nazîyên Elmanî ve hate birawestandin. Bi alîkarîya Hevalbendan ve û bi saya leşkerê sor ve û piştî girtina paytextê Hêtler Nazîya Elmanî hate birûxandin û di 8. 5. 1945 de Nazîya Elmanî bi bê bend û merc ve hate biberdestkirin û bi pêrejî cenga cîhanîyî duwem hate bidawîkirin, piştî ku têde 50 milyon kes hatin bikuştin û 58 milyon kes têde hatin bitawî û bibawîkirin; ji van jî bes û bi tenha ve ji bona nimûne 20 melyon kuştî ji Sovyête, 6 milyôn bi gazên kêmyawîyî xeniqadî ve û di nava firnên Hitlerî de şewitandî ji Cuhan û herwehajî 6 melyon kuştî ji Elman jî dihatin biderkevtin. 'Herweha jî

4Ji xwe re di vî babetê hanê de li nivîsta B. N. Ponornarjov de: "Der Sieg im Namen des Friederı", Verlag Progress, Moskau ı985 de, bi zimanê Elmanî ve bidin bitemaşekirin; jiber ku ew pir' bi nerx ve û himjî pir bi givaştî ve di vî warî de dide binivîsandin. Cuma

28Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

bi dawî hatina vê cenga cîhanîyî duwem ve sustêma kolonyalîyê û bi taybetî ve kolonyalîya Ingilîzî, Firensî, holendî û yên din hatin bilawazîkirin û ew ber bi rûxandina ve dihatin biserberjêrîkirin,

Di vê salê de sînorê impiryalizmê û kolonyalizmê bi eşkere ve hate bixuyanîkirin, ku ew nema bi tenha xwe ve dikarin serdarîyê li seransê cîhanê de bidin bikirin û ew li ser wê de bêtin bizalkirin. Dewleta Sovyêtîyî mezin pir bi xurtî ve pişta Misrê date bigirtin û jê bi darê zorê ve leşekerî Ingilîzî, Firensî û Israilî hatin bikişandin. Ev hêrîşa hanê bi serêş û derdekî mezin ve li ser serên wan de hate biderkevtin û pêrejî wehajî xebata azadîxwaz li seranserî cîhanê de hate bigeş û bigûrkirin.

Di wê çaxê de Komela Xwendevanên Kurd di cara pêşî de amadebûn xwe date bixuyanîkirin, ku Endamên wê xwe bi serbazê şûreşê ve ji bona Misrê bi dijî sustêma kolonyalizmê û kevneperestîyê ve û ji bona azadîya miletan û herwehajî ji bona azadîya Kurd didatin biderxistin. Di cara pêşî de di mêjûwa komela me dihate biderkevtin, ku hêjî çend meh di ser pêkhatina wê re nehatibûn biderbaskirin, ku wê di nameya xwe de ji bona Abdul-Nasir ew daxwaza mêjûyî date bixuyanîkirin û pêrejî wê ji bona hemû miletê Kurd û herwehajî ji bona cîhanê date binaskirin, ku xebata miletê Kurd bi beşekî ve ji xebata azadîxwazî tevaya dunyayê tête biderkevtin û pêrejî armancên wê di nava xebata miletan de bi dijî impiryalistîyê û kevneperestiyê ve têtin biderkevtin.

Di sala 1960 de bi biryara Yekitîya Netewan ve sustêma kolonyalîyê hate bihilanîn. Neha bêtir ji 153 dewletan hatine biazadkirin. Piranîya van dewletan li Afriqya, Asya û Emerîka Latînê de têtin biderkevtin û ew bi rnafeyên xweyî siyasî ve hatine bigihandin; jiber ku di sala 1919 ji 1200 melyon kes ji Xelkên dunyayê de ji 1800 melyon kes ango 70% ji Xelkên dunyayê de li jêr sîbera rêştika Kolonyalîyê de dihatin bijîyadin. Di dawîya salên şêstî de bes û bi tenha ve 30 melyon kes ango bes 1%ji Xekên vê dunyayê

de li jêr Kolonyalîya Purtugalî de li Mozambîq, Engola Û hin Giravên biçûk de têtin bijîyandirı.'
Lêbelê miletê Kurd nebes tenê ew hêjî bi mafeyên xweyî milî ve û bi mafeyê çarenûsa xwe ve nehatîye bigihandin, lêbelêjî herweha jî hêjîbêtir ew ji biçûktirîn mafeyên xweyî merovanîyê jî tête bibêpişk û bibêbehrkirin. Welatê wî Kurdistan tête bitalankirin û ew bi serdejî ve tête bibendekirin; mîna li Afriqa Jêrî de rehperestî, koletî û benditî ji bal Serdarên Borcuwazîyên Turk, Ereb û Farisan de tête bicihanîn.
5Ji xwe re di vî warê hanê de li kovara Kader de bi zimanê Erebî ve, r. 47, jimara
,11sala 4de, di gulana sala- 1972 de, çapxana Taymis, Begdadê de bide bitemaşekirin, ya ku ew ji bal Partîya Demokratî Kurdistan de tête biderkevtin.
30Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Pêkhatina Partîya Demokratî Kurd liKurdistana Surî de"
Ji rûdanên mezin di jîna siyasîyî miletê Kurd de di Kurdistana Surî de pêhatina Partîya Demokratî Kurdistan dihate biderkevtin. Bi kurtî ve li gora bîr û baweriyekê de bi lez ve ev bi hoyên pêkhatina vê Partîya Piroz ve di jîyana siyasiyê miletê Kurd de 'li Kurdistana Surî de ev dihatin biderkevtin:
Şiyabûna miletê Kurd di vê pêla mêjûyê de ji her kat û zemanekî bi bêtir ve dihate biderkevtin; jiber ku Welatperwerên Xweyîbûn li vir de ji sala 1946 - 1927de bi roleke pir giran û mezin ve himji bona şiyarbûna milî û himjî ji bona şêweyê rêxistinê hatibûn bipêrabûrı.'
Geşbûna rewşên siyasîyî demokrasî û berzbûna kêra dewleta Sovyêtê û Partîya Leninî mezin di seranserî Rojhilata Navînî de bi giştî ve û li Surî

de bi taybetî ve dihatin biderkevtin.
Hatina jimareke pir ji Penahindên Siyasîyî Iraqî de bi giştî ve û Kurdistana Iraqê bi taybetî ve ji bona Surî dihate biderkevtin, jiber ku Surî di vê pêla hanê de bi cihê hemû Penahindên Siyasî ve dihate biderkevtin. Di nava van Penaghindan jî de pir ji Endamên Partîya
6Ji xwe re di vî warê hanê de bi dûr û dirêjî ve li herdu nivistên Mohamed Mele
Ehmed de bi zimanê Erebî ve "Rûpelên ji mêjûwa tevgera azadîxwazîyî welatîYÎ
Kurd li Surî de", Beşê Yekem û Beşê Duwem, Bêrut, Libnan bidin bitemaşekirin.
Ev herdu nivistên hanê pir bi hêja û nerx ve li ser xebata milete de Kurd li
Kurdistana Surî de têtin biderkevtin. Ez hêvîdarim, ku Xwendevan di vî warê hanê
de ji xwe re ji wan herdu nivistan hanê de pir sûd bidin biwergirtin. Jibervêji ve dê
ezê di vî warê hanê de pir bi kêm ve bidim binivîsandin.
7Ji xwe re li ser Xweyibûn de li ser vê sazmendiya welatperwerî Kurdî de bi pir hêja
û giring ve bi dûr û dirêjî ve li nivista Mihemedê Mele Ehmed: .Xoybûn" de,
wergerandina ji bal Keça Kurd de ji bona Kurmancî, çapa yekem, Şam, di 15. 1.
1993de bidin bitemaşekirin.
31
Demokratî Kurdistana Itaqê jî dihatin biderkevtin. Celal Talebanî bi xwe ve roleke pir mezin ji bona navtêdana pêkanîna Partîya Demokratî

Kurdisan li Surî de date bilîstin.
Dewleta Misrî û herwehajî Surî tanî radeyekî ligel pêkhatîna Rexistineke Kurd de li Surî de jiber xurtkirina xebata Kurd li Kudrdistana Turkî de bi kêmanî ve ne bi dij ve dihatin biderkevtin.
Ji her tiştekî jî ve giringtir rewşên navxweyî Kurd ji bona vê Pêkahtîna Partî pir li kare de dihatin biderkevtin. Bes û bi tenha ve ji bona nimûne di vî warê hanê de pir ji Welatperwerên Kurd dihatin bidîtin, ku wan ji bona pêkanîna vê partîyê didatin bikarkirin û ji van, mîna ku bi bîra min ve neha tête biderkevtin, Osman Sebrî, Dr. Nuredin Zaza, Reşîd Hemû, Hemîd Derwêş û pirî pirî din dihatin bidîtin. Wan pir li ser xwe de û bi zanebûn ve li gora rewş û zîneta Kurdistana Surî de ev Partîya Demokratî Kurdistan datin bidamezirandin. Daxwazên wê ji mafeyên siyasî, civakî û zanyarî dihatin biderkevtin; yên ku ew ji nava cerg û hinavên miletê Kurd de li Kurdistana Surî de dihatin biderkevtin û ji bona wan jî roj bi roj ve ji bal gelemperiya Kurd de pişt li wan de dihatin bigirtin.
Divê li vê derê jî de bête bigotin, ku Rêxistneke Kurdî li Kurdistana Surî de bi navê "Civata Yekitîya Xortên Demokratîyên Kurd" bi taybetî ve li Cezîrê de di payîza sala 1952 de berî pêkhatina Partî bi çar salan ve hate bipeydakirin, ya ku wê xwe bi nala Liqekî ve ji Partîya Demokratî Kurdistana Iraqê ve xwe didate biderxitin. Ez bi xwe jî ve ji roja pêkhatîna vê Rexistana hanê de têde biendam ve dihatim biderkevtin. Weke ku tête biderkevtin, ev Rêxistina hanê ji bal Mohamedê Mele Ehmed, Ebdul Ezîz Ebdî, Samî Mele Ehmed Namî de û di pişt re jî de di sala ı956 de Endamên din mîna Ebdula Mele Elî, Ebdul-Rehman Şemexî, Ehmed Seyid Hemo û Ekrem Mohamed de dihate biserpereştîkirin. Piştî Pêkhatîna Partîya Demokratî Kurdistan li Surî de ez xweser bi Endamê vê partîya Pîrozî nuh ve hatim bikirin û di pişt re

teva Endamên wê Rêxistina Cezîrtê jî tev li Partî de hatin bikirin."

8Ji xwe re di vî warê hane de li nivista "Hin rûpelên mejûwa tevgera azadixwaziya
welatîyî Kurd li Surî" de, Mohamed Mele Ehmed, r. 20 - 27, Bêrut, Libnan bidin
bitemaşekirin.

32Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

Di pêla pêkhatîna Partî de pir ji alîyên Komonistên Kurd li Cezîrê de dihate bişerkirin û pir navên bed bi dû Rêber û Endamên wê ve dihatin bikevtin; belam werîsî derewan mîna her car bi kurt ve dihatin biderkevtin. Wan partî bi kevneperestîyê û tenhabûna milî ve didatin binavkirin. Hêjîbêtir wan Rêberên wê ji bona pêkananîna partî bi bê canzarbûnê ve didatin biderxistin. Wan hîc pêwistîyek, piştgirtinek û ayendeyeke mêjûyî ji bona pêkhatina partî di nava civata Kurdistana Surî de nedatin bidîtin. Wan rizgarîkirina Kurd û gihandina wîna bi mafeyên wîyî milî ve bes û bi tenha ve di pêkhatina Sosyalistîyê de di nava civaka Surî de didatin bidîtin; jibervêjî ve wan her daxwazek ji bona mafêyên miletê Kurd di wê pêle de bi dijî bîr û bawerîyên sosyalistîyê ve didatin bidanîn û ew bi kevneperest ve didatin biderxistin. Ew bi van remanên xwe ve di giraveke evsanî de dûr ji hemû bîr û bawerîyên Sosyalistî û komonistîyê beramber bi pirsa Kurd ve li Kurdistana Surî de dihatin bijîyandin. Hêjîbêtir wan bi van remanên xweyî hîç û pûç ve bi nezanî ve yanjî bi zanebûn ve .Rehperestîya Erebî û şovîya Efleqî beramber bi mafeyên miletê kurd ve di Kurdistana Surî de bi perda pêşverûbûnê ve didatin bipoşandin û wan xwe ji rastîya pêwistîya mêjûyî. ve ji bona çarekirina pirsa milîyî Kurd di Kurdistana surî de didatin bivegirtin, da ku ew dilê wê şovînîya rehperestîyî Erebî nedin bihiştin û ew wê nedin bitûrekirin. Hêjêjîbetir

piranîya pir him ji Komonistan û himjî Rêberên Kurdên qelp û nezan tevaya mafeyê Miletekî di mafeyê çarenûsa wî de, di mafeyê serwerîya wî de, di mafeyê Mirovanîyê wî de li ser bingehê Mafeyî Merov de ji bal Yekgirtina Netewan de der sala 1948 de û herwehajî mafeyî Neşînvanîya Dewletê ji bona Kurd ji xwe re didatin bijibîrakirin yanjî wan ew mafeyên hanê hîç nedidatin binaskirin, yên ku tevaya civaka bajartîya Merovanîyê û pêşkevtina miletan li ser bingehên bi danîna wan de dihate û tête bivakirin."

9Ji xwe re di vî warê hanê li nivîsta Lenin de di Derbarê Çarenûsa Netewan de bi
zimanê Kurd ve ji bal min de bidin bitemaşekirin. Herwehajî ji xwe re li nivîsta
Jean-Jacques Rousseau de Peymana Civakî de bi zimanê Kurd ve ji bal min de bidin
bitemaşekirin. Ev hedru nivistên hanê dê ligel vê nivîsta hanê û pir nivîstên din de ji
wergerandinên ji bal min de di yek CD-Rom-Silkê- de bêtin bibelavkirin.
33

Hêjîbêtir Komonistan di pêkahtina partî de Hember û Berberekî xurt ji xwe re didatin bidîtin. Piştî pêkhatîna partî bi rastî jî ve roj bi roj ve cemawerên Kurd li seranserî Kurdistana Surî de bi hemû deste, bîr û çînîyên xwe ve xwe li dora ala partî de didatin bikomkirin û Kurdan xwe roj bi roj ve ji dora Partîya Komonist didatin bidûrkirin û bivegirtin. Herwehajî piranîya pir ji Welatperwerên Kurd bi derbasbûna demê ve xwe ji nava partîya Kominst didatin bidûrkirin û gelek ji wan jî ve ji bona nava Partîya Demokratî Kurd li Surî de dihatin bikevtin.
Ew nobûna carcaran ku di navbera Partîya Demokratî Kurdistana Iraqê û Partîya Komonistî Iraqê de dihate biderkevtin, ew nobûna hanê di

nava Partîya Demokratî Kurd li Surî de û Partîya kominstî Surî de nidihate biderkevtin; jiber ku rewş û zinetên mêjûwayî li herdu perçên Kurdistanê de bi cudabûn ve dihatin biderkevtin û herwehajî pêrejî daxwazên wan jî bi cudabûn ve dihatin biderkevtin.
Gava ku em van rastîyên mêjûyî li vir de der barê Partîya Komonistî Surî de didin biderxistin, divê rola wan di şiyarkirina Kurdan de û hêjîbêtir di pêşkeşkirina pir Kadirên jêhatî û zannevan de ji bona Partîya Demokratî Kurd li Surî de nedin bijibîrkirin. Roj bi roj ve bi saya kadirên Partîyî nuhhatî ve û bi saya van Kadirên Komonistî hatî de Partî deha dihate bixurtkirin û wehajî pêrejî bi vê endazîya hanê ve deha Partîya Komonist di nava kurdan de dihate bilawazîkirin û hîç jê re di nava civaka Kurdan de li ser bingehê wê siyaseta wê de beramber bi çarekirina pirsa milîyî Kurd ve li Kurdistan" Surî de ne cih û ne war dihate bidîtin.
Belê Partîya Demokratî Kurdistan li Surî de di sala ı95611957 bi yarmetîya Partîya Demokratî Kurdistana -Iraqê -ve hate bipêkhatîn. Navê wê di destûr û peyrewa wêyî pêşî de bi Partîya Demokratî Kurdistana
Surî ve dihate biderkevtin. Belam ew destûr û peyrewa hanê bi lez û bez ve ji nava destên Endaman hate bikişandin û navê Partî di pişt re xweser bi Partîya Demokratî Kurd ve li Surî de hate biveguhertin.
Weke ku neha ev bi bîra min ve tête biderkevtin, ev jî li ser pêşneyara Ismet Şerîf Wanlî hate bikirin; jiber ku di wê çaxê de nuh Ismet Şerîf Wanlî ji bona Şamê hatibû bivegerandin. Ev ve guhertina hanê bes. û bi tenha ve ji alîyên qanûnî ve hate bikirin, da ku dijwarîyên bêtir ji bona Partî û Endamên wê neyêtin bipeydakirin.
34Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Destûr û Peyrew di navroka xwe de bi dûr û dirêj ve bigir bi mîna xwe

ve hate bimayîn.
Partî bi roleke mezin ji bona şiyarbûna milî û civakî ve di nava cemawerên Kurdistana Surî de hate û tête bipêrabûn; jibervêjî ve bi tundî ve ew ji bal Rehperestêrı Ereb û faşiyên Ef1eqî de dihate bişerkirin. Rêberên û Endamên wê di salên şêstî de ji bona binê zindanan ditatin biavêtin û ew ji bona ber dadgehên bes bi nav ve didatin biavêtin û ew li gora qanûnên rehperestî de didatin badkirin. Herwehajî ne kembera Erebî û nejî amara ji rêkevtîyî faşî ve û ne jî pêşneyarên Mohemed Teleb Hilal di Xwendekarîya xwe de ıoli ser herema Cezîrê de ji bona bi erebkirina Kurdan ve mûyekî xebata miletê Kurd li Kurdistana Surî de dane birawestandin. Lêbelê tev li van pêrabûnên rehperestî faşiyîyên Ef1eqî de xebata Partîya Demokrat Kurd her û her di nava Kurdistana Surî de dihate û tête bixurtkirin û bigeşkirin.
Kurdistana Surî tanî dawîya cenga cîhanîyî yekem bi beşekî ve ji Serlteneta Osmanî ve dihate biderkevtin û ew li paş de li ser bingehê peymna Sykes'l-Picot -Sayks-Piko-" de û bi parvekirin nuh ve Surî,
ıo Ji xwe re di vî warê hanê de li ser Xwendekarîya Mohamed Teleb Hilal li ser
herema Cezîrê û pêşneyarên wiyî faşiyî Efleqî de di erebkirina miletê Kurd de di
Kurdistana Sum de li: Kurdica, Journal of Kurdish Affirs, Ne. 1, Julay 1968 de, r. 8,
bi zimanê Ingilîzî ve bidin bitemaşekirin.
i1 Ji xwe re li ser Sykes û şêweyê nivîsandina vê pemana Sykes - picot de di
giringbûna wê de li nivîsta Israel lntern de ji bal Ame Jörgensen, Militarverlag,

VEB, r. 60- 71, Berlin 1984 de bidin bitemaşekirin.

12Ji xwe re li vêderê de bi dûr û dirêjî ve li nivîsta M. S. Lazerêv de di wergerandina
zimanê Erebî de ji bal Dr. Ebdi Hacî de di bin navnîşana: "Pirsa Kurd ji sala 1917-

"1923de bidin bitemaşekirin. Lazerêv yekek ji gewretirîn Karnasê Mêjovanê Kurd
ve tête biderkevtin. Wî pir bi dûr û dirêjî ve li ser mêjûwa kurdistanê û pirsa miletê
Kurd de dayite binivîsandin. Cihê wî di Kemasiya mêjûwa miletê Kurdistanê de ne
bi kêmi ka masiyê Minoriskî ve tête biderkevtin, ku herdu jî bi Rus ve têtin biderkevtin. Lazerêv der sala ı993 de di Kongirê Partîya Demokratî Kurdistan de
ligel Mêjûvanên Nasvan de Hesrestyan û Şakirov di kongirê IL de li paytextê
Kurdistanê de li bajarê Hewlêrê de hatin bibeşdarîkirin. Pir rêz û hêjabûn ji bona
Pirofêsor Lazerêvê Rusî, Pirofêsor Hesretyanê Eremenî û Pirofêsor Şakirovê Kurdî

35

Iraq Û Felestînê ve di nava Ingilistan û Firensa de Surî vê carê bi para Jêrdestîya Firensî ve hate bikevtin û sinorê Surî di peymana Anqera de der sala 1922 di navbera Firensa û Turkî de hate bidanîn. Kurdên Kurdistana Surî her û her wan bi serxet û binxet ve didatin bigotin. Mebest li vê derê de şiva hesinîyî tirênê bû, ya ku ew bi şiva hesinîyî Berlin - Begdadê ve dihate biderkevtin, ya ku ew ji bal Elman de di berî cenga cîhanîyî yekem de hatibû bivakirin.

Partîya Demokratî Kurd li Suryê de di befirbara sala 1962 de daxuyanîk bi dûr û dirêj ve li ser rewş û zîneta Kurd de ji bona bîr û bawerîya gişтîyî Cîhanî, Erebî û Surî ve date biderxistin. Ji ber giringbûna vê daxuyaniyê hanê de ez wê li vêderê de ji zimarrê erebî didim biwergerandin û wê li vêderê de ji bona xwendevanan didim bitomarkirin, da ku ew bêtir ji xwe re li ser rewş û zîneta Kurd de di wê dema hanê de bêtin biliberkevtin:

"Daxuyanî ji bona bîr û bawerîya gişтîyê Cîhanî, Erebî û Surî de

Di vê qonaxa mêjûyî giring de, ya ku têde welatên Ereb têre têtin biderbaskirin, herwehajî ya ku têre bi taybetî ve Surî tête biderbaskirin, bi qonexekê ve tête biderkevtin, ya ku ew ji Serdarên Ereban re û herwehajî di pêşîya wan jî de ji Serdarên Surî re dide bixwestin, ku ew li gora endazîya berpirsiyarîya xweyî mêjûyî de û milî de bêtin biderkevtin, da ku ew daxwaza cemawerên fireh di azadîyê, demokrasîyê û jîneke xweş de bidin bicîanîn û herwehajî da ku ew aramîya hundurûyî daxwazkirî li pênavê rewestandina beramberî pîlanên Impiryalîyê de bidin bigirawkirin, ji yên ku ew bi dijî Ereban ve bi veşartî û eşkere ve têtin bitevinkirin.

Di gava ku em xwe di nava van zînetên hanê de bi xwe ve didin bidîtin, jimarek ji rojnamên Surî de ji dêlva ku ew xwe ligel çarekirineke nuh de ji bona pirs û derdên Erebîyî pir de bidin ji bal hemû Endamên Kongire û hemû Berpirsiyarên Partî û serdarîya heremê û pir bi taybetî ve ji bal kak Mesud Barazanî ve hate bigirtin. Herwehajî ligel wan jî de Dr. Beşîr Sebrî, Dr. Letif û Dr. Sededal ji Mosko hatibûn biha tin û ew jî di Kongire de hatibûn bibeşdarîkirin û pir rêz jî li wan de hate bigirtin.

36Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
bireftarîkirin, ew milet bi nûçeyên pir bi tirs ve li ser hebûna .metirsîya Kurd", .Jsraila Duwem" û .Kevtineke Kurdî"de bi nav ve didin biagehdarîkirin, ya ku ew Surî di sê goşeyê neftî de di Parêzgeha Cezîrê de ber bi tirs ve dide bixistin. Van rojnmanên hanê rûpelên xwe ji bona vê hêrîşa .Jıêstêrîyî" navînî de li ser Neşînvanên Kurd de di nava rûpelên xweyî pêşî de dane bigirêdan. Herwehajî sergotarên wan jî li jêr navnîşanên gewreyî diyar de li ser wê metirsîya hanê de didin binivîsandin. Pir ji rojnamên cihanî û dam û destgehên ragiyandinan jî ew nûçeyên hanê dane biveguhestin û bîr û bawerîya cîhanî bi carekê ve pir guhên xwe pê datin bidan.
Kar û bar ne bes tenê li ser wê hêrîşa sitembar de hate birawestandin, hêjîbêtir li gel wê jî de peyvên wetov bi mîna wan hêrîşên hanê ve ji bal hin Berpirsîyarên di serdarîkirinê jî de dihatin biderkevtin, ji yên ku ew bi tirsfırandinê û givbûnê ve têtin bitijekirin. Herwehajî pêrejî civînên Civta Wizaretê bi amadebûna Parêzvanê Cezîrê jî ve li dûhevdû de dihatin bigirêdan, ku di nava wan de siyaseteke jirêderkevtî bi teybetî ve hate biderkevtin, ya ku ew divê ji bal serdarîyê de bi beramberî Kurd ve bi giştî ve û bi beramberî herema Cezîrê ve bi taybetî ve li ser de bête biçûyîn, ya ku ew divê bi siyaseteke jirêderkevtî ve bête biderkevtin, mîna ku rojnaman ew didatin bipesindan, da ku ew bi mîna bernameyeke rnilîyî taybetî ve bête biderkevtin û bendên wê divên bi carekê ve li ser hemû· serdarîyên hatî de bêtin bicîhatin, ji yên ku ew li duhevdû de ji bona ser destên serdarîyê de di pişt re têtin bihatin.
Hîç gûnam lê nayête bikirin, ku dê ev hêrîşa rojnemevanîyî çêkirî û ligel jî de pêrabûnên ji rêderkevtiyên Mîrî de, ji yên ku ew ji bal serdarîyê de li ser Neşînvanên Kurd de têtin bigirtin, şopeke pir

bed di nava pêwendîyên biratîyî mêjûyî de di navbera Miletên Ereb û, Kurd de bidin bihiştin. Jiber ku miletê kurd li Surî de ji hemû destikên derxistina bîr û bawerîya xwe de beramberî vê hêrîşa sitembar de tête biderkevtin, ya ku ew îro bi bê hoy ve tûşî wê tête bikirin, Partîya Demokratî Kurd di Surî de danîna vê pirsa hanê li ber bîr û bawerîya Cihanî û Erebî de di vê daxuyanîya hanêyî kurt de ji bona ser milên xwe dide bihilgirtin, da ku hemû li ser destana jandarî de bêtin biagehdarîkirin, ya ku ew bi ser serên Zarokên vî miletê hanê de tête bikevtin, ji yên ku ew dê ji bal serdarîyê de bêtin bipêrabûn, da ku ew

xelkê ji Nişînvanîya dewletê de bidin birûtkirîn û bi komel ve xelkê bidin bibarkirin. Ev pêrabûnên hanê tev de bi hevdû re dê derd û azarên qirkirinê bidin bipircarkirin û dê ew bisedan ve bi xelkê ve bêtin bikevtin.

Dibe ku her Merovekî bi rûmet ve îro ji xwe bide bipirskirin, ji yê ku ew pêşkevtina vê hêrîşa pir bi derew û deng ve û çêkirî ve li ser hebûna vê kevtina hanê de û metirsîya Kurdî bi navkirî ve ji xwe re lê bide bitemaşekirin, ya kuji bona van derewên hanê de tu bingehekî rastîyê nayetê biditîn: Magelo çi ji mebestîyên veşartî de li pişt vê hêrîşa hanê de li ser wan Neşînvanan de têtin biderkevtin? Bersîv li ser vê de em didin bigotin, hîç di nava vê girêka hanê de tu veşartok nayetê biderkevtin, ku ew nayête biçarekirin. Ji her Merovekî re bi eşkere ve tête biderkevtin, gava ku ew ji xwe re li ser çûna kar û baran de di nava heremên Kurdî de û bi taybetî ve di nava herema Cezîrê de dide bimeyzekirin, ku ev hêrîşa neha bi xelekekê ve ji xelkên siyaseta heyî de li ser zordarîya rehperestî de beramber bi Kurd ve di nava Surî de ji pêla serxwebûnê Û. tanî neha de tête biderkevtin. Herwehajî raperîna Ilula pîroz jî ji -van berên siyasî de tu tişt nedatebiguhertin;

lêbelêjîhêjî biserdejî ve serdarîyên hatî ji bona ser serdarîkirinê de ew siyaseta zordarîyî rehperest beramber bi Kurd ve didatin bibêtirkirin, tevî ku milet li ser wê raperîna piroz de pir hêvîyên fireh li ser de didatin bidanîn,; belam ew serdarîyên hatî hêjîbêtir di zordarîkirina li ser Kurd de bêtir ji xwe re didatin bikirin.
Serdariya îro jî hêjî ji bona lêdana ji bona pêwendiyên biratî û bestandinêm mêjûyîyî pir dirêj di nava Ereb û Kurd de tête biçûyîn û ew tengavîyekê dide bidurustkirin, ku têde berjewendîya welatîyî bilind bi carekê ve nayête biderkevtin.
Em tevde pir bi başî ve li ser kar û baran de di nava Iraqê de bi agehdar ve têtin biderkevtin, ku ew bes û bi tenha ve ji bona vê nobûna tengavîyî hanê de hatin bigihandin; jiber ku siyaseteke ne bi şehrezayî ve beramber bi miletê Kurd ve di wir de hate bikaranîn, ya ku ew ji bal hin hişên dorhêla Ebdul-Kerim Qasim de dihate bidanîn, jiber ku wan Ebdul-Kerin ji bona nava gewretirîn tengavîyê de datin biavêtin, ya ku divabû ji roja wergirtina wîna de ji serdarikirinê de di piştî şûra ı4 tîrmehê de bida biçarekirin.

38Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

Partîya Demokratî Kurd li Surî de di mêjûwa 19. 12. 1962 de bi bîrxistinek ji bona serdarîkirina Beşîr El-Ezme û Wênerên Partîyên siyasî di nava welêt de date bipêşkeşkirin, ku wê têde siyaseta bikarhatî bi beramberî Kurd ve di wêlet de date bixuyanîkirin, ku ew ne ji berjewendîya welatîyî bilind ve tête bigirtin û nejî ew ligel canê biratîyê, dostanîyê û pêwendîyên mejûyî heyî de ji pir Nifşan de di navbera miletên Ereb û Kurd de nayête biguncandin; jiber ku ew siyaseta hanê bi serûştîya zordarîyê û cudabûna rehperestîyê ve tête biderkevtin, ya ku ew bes û bi tenha ve di nava van rojên meyî hanê de pişgirtinê û rıavtêdanê ji dam û destgehên Impiryalîyê û Gurûhên

vetisandî de di nava kevneperestiyê de ji xwe re dide biwergirtin û ya ku ew ne ligel canê serdemê de û nejî ligel bextê zindîyî merovanyê de û bingehê mafên Merov de tête biguncandin.
Mexabin, ku divê em bidin bigotin, ku ev herîşên hanêyî zordarî di nava heremên Kurd de ji raperîna 28 Holê tanî neha de nehatine bibirîn, herwehajî ji wê mêjûyê de ji bona dadgehên asayîşa dewletê û dam û destgehên beşên siyasî de, mîna ku di bîrwerîya çûyî de hatîye bigotin, bêtir ji sêsed bi navbidûxistina xebatkirinê ve ji bona milîbûna Kurd ve hatine biajotin. Li ser piranîya wan de bi dandkirinên salekê û tanî sal û nîvekî ve hatine bidadkirin. Herwehajî pir kes bi ber lêdan û girtinê ve hatine bikevtin û ew ji bona ber dadgehan de hatine biajotin. Ev jî di piştî nardina mêjûwa pêşkeşkirina bi bîrxistînê jî ve ew hemû bi navbidûxistinên hanê hatin bikirin; ji yên ku ew hemû bi navbidûxistinên bi tawanbarîyên çêkirîyî cundan ve dihatin biderkevtin. Jimara Girtîyan tanî neha bigir bêtir ji pêncsed Kesî ve tête biderkevtin û ew jî bes û bi tenha ve ji ber hoyên mîlî de hatine bigirtin.
Di wê pêla hanê de Partî di wê bîrxistina xweyî pêşkeşkirîyî bi navkirî ve ji bona serdarîyê de metirsîyên xwe datin biderxistin, ku ev pêrabûnên hanêyî zordarî der derbarê Kurd de di pişt re bi siyaseta dewletêyî mîrî ve dê bête biveguhesztin û bipêşvekevtin û ew ji xwe re serûştîyeke ji rêdekevtî ve beramberî vî miletê hanê de dê bide bigirtin, yê ku ew hemîşe bi dilsoz û piştrast ve ji bona vî welatê hanê de hatîye bimayîn û yê ku pê ve û lêvê nayête bikevtin, ku ev siyaseta ji rêderkevtîyî taybetî de di derbarê wî de bête bicîanîn, ya ku ew li ser zordarîyê û cudabûna rehperestîyê de tête biavakirin.
39
Nîşanên çûna siyaseteke wetov beramber bi Neşînvanên Kurd

ve diyarên wê bi eşkere û diyar ve di peyvînên mîrî de têtin biderkevtin, ji yên ku ew ji bal Merovên Dewletê de di pêla vê hêrîşa heyî de têtin biderkevtin. Bi çi beri jî ve nêt ji bona durustkirina Wizareteke taybetî ji bona kar û barên Cezîrê ve, yanjî bi dana Parezvanê Cezîrê ve bi desthilatîyên fireh ve ji bona bi rêvebirina kar û barên heremê jî ve û herwehajî ligel peyvînê de bi mayîna li ser zîneta ji rêderkevtî ve di heremê de, ya ku ew di hemû hêlên welêt de hatîye bihilanîn, herwehajî peyvîna, ku Cotkarên Kurd di Cezîrê de divên ji Çakkirina Çandinêyê de jê nedin bikarkirin; jiber ku ew bi Biyanî ve û bi Kevtî ve têtin biderkevtin, bête biderkevtin, ev pêranûnên hanê tevde bi hev re bi danîna metirsîya nala vê siyaseta ji rêdetketîyê çepel ve derbarê Neşînvanên Kurd de didin bizengilkirin. Serdarî di neha de ji bona bicîanîna siyaseteke zordarî derbarê Neşînvanên Kurd de lijêr perda hebûna kevtineke Bêgane de ji bona heremê de dide bikarkirin, ya ku ew di vê bêhna hanê de amara serjimara Kevtînavan bi sed hezar Kes ve dide bitexmînkirin û ew sûcê vê kevtina hanê ji bona ser serdariya Endul-Nasir ve dide biavêtin; jiber ku di peyvîna Berpirsiyaran de hatîye bihatin, ku ev kevtina hanê di nava van çar salên dawî de ango di pêla Yekîtiyê de hatîye bikirin. Tevî ku hemû di wê bîr û bawerîyê de têtin biderkevtin, ku Ebdul-Nasir didate bikarkirin, ku ew Cotkarên Cezîrê jê bide bibarkirin û li şûna wan de û ji dêlva wan de Misriyan di heremê de bide bineşînîkirin. Heger ku ev bîr û bawerîya giştî bi rast ve bête biderkevtin, magelo ber bi hiş ve tête biderkevtin, ku Ebdul-Nasir dê rê bi sed hezar Kevtiyên Bêgane ji Turkî ji bona nava Cezîrê bide bidan, yê ku wî bi xwe jî ve derkirina xelkên kokî jê didate bixwestin? Çîroka kevtinê û hêrîşa çêkirîyî taybetîyî îro li ser wê de ji kar û barên ji dûr ve bi nêtkirî ve ji pêleke dirêj ve têtin biderkevtin, ji yên ku neha

ji wan re di vê siyaseta neha de têtin biamadekirin. Ji van jî pêrabûna bi amara taybetî ve tête biderkevtin, ya ku ew di pêncê meha çirya pêşîyî çûyî de di Parêzgeha Hesekê de bi tenha xwe ve pê hatîye birabûn, ya ku ew bi perçeyekî gişti ve ji vê pilana hanê ve tête biderkevtin û ya ku ew bi amadebûnê ve ji bona vê hêrîşa heyî neha de tête biderkevtin.

40Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

Tiştên ku balpêdanê di vê hêrşa çêkirîyî neha de ji bona ser Kurd de dide biderxistin, ku Balyozê Emerîkî jihatîbûnênên xwe dide bixurtkirin û ew bi çend rojan ve bi berî despêkirina hêrîşê ve ji bona serdana herema Cezîrê û Serê Kanîyê de pê hate birabûn û herwehajî Balyozên Turkî û Iranê jî herdu Endamên Peymana Sento li Şamê de bi jêhatîbûnên diyar ve ji roja destpêkirina hêrşa rojenamevanyî de bêtin birabûn. Herwehajî ev bi xwe jî ve ev hîrîşa hanê di demekê de tête bikirin, ya ku têde pîlanên Impiryalîyê û Sehyonistîyê li ser tevaya welatên Ereb dr-:)i giştî ve û li ser Surî de bi taybetî ve têtin binokirin. Ev kar û barênhanê bi banga metirsîya .Jsraila Duwem" ve jê tête bibêhnkirin, ku ew bi karekî ve ji bona dakevtiunê ve ji bona Israila Yekem ve bête biderkevtin, yanjî dibe ku ew bi destpêkekê ve ji bona bi cîanîna pîlaneke Impiryalîyî çepel ve bête biderkevtin.

Ho miletê Surîyî merd bi hemû desteyên wîyî welatî ve ji Zanevan, Bazirganan, Çandîvanan û Kargeran!

Miletê Kurd, yê ku ew di nava cerg û hinavên xwe de li ser destên Serdaran de hatîye bibirîndarîkirin, we di vê roja hanê de li ber berpirsiyareke gewreyî mêjûyî de dide bidanîn û ew tevaya bîr û bawerîya cîhanî li ser we de dide bibînvankirin, ku heger hûn li ser van rûdanên kîrî de beramber bi Kurd ve bêtin bibêdengîkirin. Birek ji Serdaran ber bi herifandinê ve xwe didin biajotin, ji ya ku Nifşan

dabûn biavakirin û ew wê pêwendîya biratîya canî di navbera miletê Ereb û Kurd de didin bibirîn. Herwehajî şêtbûna Eseed Mahasin û nebaşbûna reftara Seid El-Seyid û bi navkirina wan ji bona miletê Kurd ve bi .Jsraila Duwem" ve û herwehajî bê pişkirina hinekan ji wan ji Neşînvanîya Dewletê û ji Erd ve dê ev tevde ji bona welatê meyî şêrin ji bil cudabûnê û serşorîyê pêvê tu tistekî din nede bianîn. Impiryaliyê rêya xwe bi vî rengê peroşî ve ji bona me dide bibîrin û dê ew her û her di nava me de bide bicudakirin, heger ku ev pirsa hanê bi çarekirineke şehrezayî û dilsozî ve dûr ji şêtbûnê û İnebestan ve nêyete bidermankirin.

Debera ew kesên hanê bidin bizanîn, ji yên ku, ew dixwazin erdên Kurd li ser Hevalbend û Dostên xwe de li jêr' perda qanûna çakkirina çadniyê de bidin biparvekirin, ku ew bi yarîyeke ne biserkevtî ve têtin biderkevtin; jiber ku Kurd dev ji xakê xwe ve ji tu kesî re nadin biberdan; çendjî ew bi buha ve li ser wan jî de bête

birûnişştin. Jibervêjî ve weha divê di gava bicîanina qanûna çakkirina çandinîyê de erdên Derebegên Kurdli ser Perîsanên wan de bêtin bibelavkirin, ji yên ku ew bi sedan sal ve Bav li dû kal de bi nala Kargerên çandinyê ve erdan didin bihilanîn û bidanîn. Weha dê dilên Kurd bêtin bicîkirin, ku ew di nava Birayên xwe de û ew ne di nava Dujminên xwe de têtin bijîyandin.

Vegerinadin ji şaşbûnê bi qencîyê ve tête biderkevtin û çûn li ser wê de bi Merovên Berpirsîyar ve ji bona ayinda welat û miletê xwe ve nayête bikevtin. Bangirina bi kevtina bi hezaran û deh hezaran ve bes û bi tenha ve bi derew û sextekariyê ve tête biderkevtin. Jibervêjî ve em ji bona Serdarên xwe didin bibangkirin, ku ew li ser siyaseteke şehrezayî de bermaber bi miletê kurd ve di Surî de bêtin biçûyîn û ew

tevaya wan biryarên ji rêderkevtîyî wergirtî ve ji baİ xwe de bidin bihilanîn û herwehajî ew dev ji wê bedyê ve bidin biberdan, ya ku ew ji bil berên tal ve nade bidan. Em ji bona çûna li ser siyaseteke baş û avaikirî ve û rêpêdan ji bona Kurd bi karanîna mafeyên xweyî zanyarî û civakî ve, -divê li vêderê de bête bizanîn, ku Israil bi xwe jî ve tu çavtengîyê li gel van mafeyan de beramber bi Erebên Felestîn ve nade bikirin-, û herweha jî ji bona wan rêpêdana pêşvekevtinê di nava welatê Surî de, herwehajî dûrkirina herdu Pehlewanên temaşegehê ji Esed Mahasin û Seid Seyid ji Cezîrê de, herwehajî divê Girtiyên bê guneh jî bêtin biberdan, ji yên ku tu gunehên wan nayetin bidîtin, ji bil ku bes û bi tenha ve bi mîlibûna Kurd ve têtin biderkevtin, didin bibangikirin. Ev tevde dilên miletê Kurd didin bixweşkirin, yên ku ew di nava c=rg û hinavên xwe de pir bi wê siyaseta Serdama ve hatibûn bişermezarikirin.

Silavên me ji bona wan Merovan têtin biderkevtin, ji yên ku ew li ser rêya rast de têtin biçûyîn.

Befirbar sala 1962 de

Partîya Demokratî Kurd li Surî de"

Gava ku Merov ji xwe re bi dûr û dirêjî ve û di nava wê dema hanê de li navroka vê xuyanîya hanê de dide bitemaşekirin, bi carekê ve siyaseta şovînîyî Erebî ji Merov re beramber bi miletê Kurd de di

Kurdistana Surî de tête biderkevtin. Ji alîyekî de partî bi rengekî nerm ve û li ser xwe de wê siyaseta hanêyî şovînî him beramberî bîr û bawerîya miletê Ereb û himjî beramberî bîr û bawerîya giştîyî Cîhanê de dide birutkirin û ew têde tevaya çepelîya wê siyaseta hanê dide biderxistin. Ji alîyê din ji me re têde ne bes tenê tevaya destana miletê Kurd li Surî de û herwehajî tevaya destana miletê Ereb têde dide

biderxistin, gava ku ew wê siyseta dûr ji berjewendiya xwe beramber bi miletê Kurd ve di Kurdistana Surî de dide biderxistin. Ez naxwazim li ser hemû navroka vê daxuyanîya mêjûyî û rast de bi dûr û dirêjî ve bidim biaxivtin; jiber ku Xwendevanên hêja dikarin li gora bîr û bawerîyên xwe de û hewehajî li gora têgihiştina xwe de di serpêhatîyên mêjî de dikarin li ber remanên hatî de di wê daxuyanîya hanê de bêtin biliberkevtin. Ez dixwazim pir bi kurtî ve li ser Israila Yekem û Duwem de bidim bi axivtin , da ku Zanisvtan û Dilsozên miletên Ereb ji xwe re li ber wê siyaseta Çepelên Şovînîyên Ereb de bi başî ve û zîyana wê bêtin biliberkevtin û bi taybetî jî ve beramber bi mieletê Kurd ve bêtin biliberkevtin.

Belê Miletê Ereb çi di rêya Şovînîya xwe de û çi jî di rêya siyaseta Ebdul-Nasir de beramber bi Israila Yernkem ve di her pênc cengên xwe de ji bona avêtina wan ji bona nava deriya sipî de û qirkirina wan de ji sala 1948 de u tanî sala 1973 de her û her bêtir Israila Yekem li ser kêsê xakê Ereb de dihate bigewrekirin, tanî ku bi sê carî ve hate bikirin. Bes û bi tenha ve ji bona pirsê û nimûne ez li vir de didim binivîsandin, heger ku Ereb bi biryara parvekirina Felistînê ve der sala 1947 de bihata bipêrûniştin, dê ji wan re ne bi pir baştir ve bihata biderkevtin? Çûn li ser wê siyaseta şovînîyê hanê de pir ziyaneke mezin û gewre bi miletê Ereb ve bi giştî ve û bi miletê Felestînî ve bi taybetî ve date bixistin. Heger ku Ereban der sala 1965 de bi gotina Ebu Ruqeybe bidana bikirin, gava ku wî date bigotin: .Jsrail bi xewin ve dihate biderkevtin, iro bi rastî ve tête biderkevtin û divê bi vê rastîya hanê ve bête birûniştin". Piranîya Serdarên Ereb û Miletê Ereb ew bi Bêbext û Xinêz ve beramber bi miletê Ereb ve date binîşankirin.

Miletê Misrî di destpêka sedsalên nozdehan de li jêr Rêberîya

Mohamed Alî Paşa û kurê wîyî Irnrahîm Paşa de date bixwestin, bi kurtî ve û bi dijî berjewendîyên dewletên mezin ve ji Rus, Ingilîz û
43
Elman de tevaya Selteneta Oasmî ji xwe re bi alîkarîya dewleta Firensî de bide bivegirti; belam der sala 1839 de sipahê Misrî li jêr Rêberîya Ibrahîm Paşa hate bitar û markirin û ji nava siyaseta Navdewletan de hate bipengizandin û di encamê dawî de Misir ji bal Ingilistanê de hate bivekirin û tanî sala 1954 de dûr yanjî nêzîk hate bimayîn. Careke din Misirîyan der sala 1965 de datin bixwestin, ku ew vê carê bi navê milîbûna Ereb ve tevaya Rojhilata Navînî bi bin destên xwe ve bidin bixistin, mîna ku Mehdawî di sala 1959 dedi Dadgeha Gel de di piştî şureşa Şewaf de didate bigotin: "Misrî ji xwe re didin bixwstin, ku ew xurma ji alîkî de û neftê ji alîyê din de ji bona nava birîkên xwe de bidin bixistin", Nasir wetov didate bibawerîkirin, ku ew dê Israîla Yekem ji bona derîya Sipî bide biavêtin û tevaya zalbûna xwe li ser herêmê û nefta wê de bide bizalkirin. Belam sipahî wî û hemû sipahên Erebîyî din di şerê 5 axlêva sala 1967 de di nava şeş rojan de hatin bitar û bimarkirin û Ebdul-Nasir ji gorepana Siyasî pir tanî mirina xwe hate bilawazkirin. Herwehajî di cenga Oktober jî de careke din hemû sipahên Ereb ji bal Israila Yekem de hatin bitarûmarkirin. Pirsa ku li vê derê de tête bikirin, heger ku Miletê Ereb li ser wê siyaseta çepel de nikarîbûn û nikarin jî Israila Yekem bidin biqirkirin, magelo dê ew çilo bikaribin Israila Duwem bidin biqirkirin?
Israila Yekem nehate biqirkirin; bes û bi tenha ve jiber ku pişta wê ji bal dewletên mezin de her û her dihate bigirtin. Miletê Israil piştî Diyspora -Derkevtina- du hezar sal ji nava welatê xwe de û piştî qirkirina şeş milyonan jê ji sala 1939 tanî sala 1945deji bal Elmanya Nazî de careke din bi piştgirtina sozê Bel for de der sala 1917 de dets

bi xebatê ve ji bona vegerandina xwe ji bona nava Felestînê û avakirina dewleta xwe de date bikirin, ya ku wê ew der sala 1948 de date bidursustkirin û ew ji xurtirîn dewletên Rojhilata Navînî neha tête biderkevtin. Heger ku ev dewleta Israila Yekem ji bona xatirê çavên Miletê Ereb û şovênîyên wîna de pişta Israila Duwem bes û bi tenha ve ji bona qazanc û berjewendîya xwe bide bigirtin, magelo dê çi zîyan bi miletê Ereb ve di Surî û Iraqê de bête bikevktin? Vê bersîva hanê ji bona Zanistvan û Dilsozên miletê Ereb de didim bihiştin; jiber siyaseteke wetov pir bi ziyan ve beramber bi miletê Kurd ve ji bal Şovînîya miletê Ereb de di encamê dawî de bi ziyana Miletê Ereb ve tête bidawîkirîn. Ez hêvîdarim, ku miletê Ereb dê pir guhên xwe ji

bona vê zîya hanê de beramber bi miletê Kurd ve bide bidan û dê ew şev û rojê bes û bi tenha ve ji bona berjewendîya xwe rê bi şovonîya xwe ve nede bidan, da ku ew wê siyaseta hanê beramber bi Kurd ve bide bikirin, ya ku ew di encamê dawî de bi bedbextiiya miletê Ereb ve bi neçarî ve dê bête bidawîkirin; jiber ku dujminatîya di navbera miletê Israila Duwem û miletê Ereb de dê pir bi zîyantir ve û bi tundtir ve ji dujminatîya di navbera miletê Israila Yekem û miletê Ereb de di encamê dawî de bête biderkevtin. Ev dujminatîya hanê ne bi qazanca miletê Kurd ve û nejî bi qazanca miletê Ereb ve tête biderkevtin. Em tevde bi hev re divê bidin bihêvîdarîkirin, ku miletên me ji vê bedbextîya hanê de bêtin bidûrkirin û dosatî û biratî di nava wan de li ser bingehê berjewendîya herdu miletan de dê bêtin biavakirin. Ev jî bes û bi tenha ve dûr yanjî nêzik bi têgihiştina miletê Ereb ve di berjewendîya xwe de tête biderkevtin. Dem bi hemû tirş û talîyên xwe ve dê vê rastîya hanê bi neçarî ve ji me re û herwehajî ji miletê Ereb re bide biderxistirı". Kurd divê her û her ji bona dostanîyê li ser binghê

livandina berjewendîya milîyî de ligel miletê Ereb de bide bikarinû wetov jî bes û bi tenha ve divê miletê Ereb li ber wê dostanîya hanê de bête bikevtin.

Partîya Demokratî Kurd di 5. 5. 1964 de bersivek li ser peyva Serokê Civata Welatî de ji bona Rêberîya şureşê Amîn Al-Hafiz date bidan, gava ku wî di hatina ahenga 8 avdarê de gotinek date bixwendin û ew li ser pêkhatina encumenekê de hate biaxivtin, da ku

13Ji xwe re di vî warê hanê de li namilka Ismet Şerîf Wanlî de bi zimanê Erebî ve di

bin nav û nîşana: "Cîhana Erebî û Cenga Ruzgarîkirinê di Kurdistana Iraqê de"

bidin bitemaşekirin, ya ku Ismaet Şerîf Wanlî ew li Siwêsra de di 28 meha çirya pêşî

de di sala 1963 de dayite binivîsandin. Ev namilka hanê bi rastî ve pir bi rengekî

zanistîyî bilind ve hatîye binivîsandin, ku xwendekarîya wêna ne bes tenê ji bona

Xwendevanên Kurd pir bi kar û sûd ve tête biderkevtin; lêbelê xwedekarîya wêna ji

bal Xwendevanên Ereb jî de pir bi nerx û hêja ve tête biderkevtin, da ku bêtir li ber

divabûna çarekirina pirsa Kurd bi şêweyekî demokrasî û aşîtî ve ji bal serdarîya

Iraqê û Surî ve di nava Kurdistana Iraqê û Surî de bêtin biliberkevtin; jiber ku ew

çarekirina hanê ji bona pirsa Kurd pir di berjewendîya miletê Ereb de tête biderkevtin û her şêweyekî zordarî li ser bingehê şêr û cengê de pir bi zîyana miletê

Ereb ve di Iraqê û Surî de di encamê dawî de tête biderkevtin.
45
ew destureke demî ji bona welêt bide bidanîn û herweha jî ew di vê peyva xwe de li ser pirsa Kurd de hate biaxivtin. Ev bersiva hanê wetov hatîye binivîsandin.
Jiber ku ev bersiva hanê pir ronahîyê li ser siyaseta serdarîya Basî de beramber bi miletê Kurd ve dide biderxistin, ez wê jî li vê derê de ji bona Xwendevanan didim biwergerandinû bitomarkirin, da ku Xwendevanên giramî bêtir li ber wê siyaseta hanê de di nava wê demê de bêtin biliberkevtin:
"Ji bona Civata Welatîyî Rêbera Şûreşê
Di pevdarîya xwe de Serweriya Serokê Civata Welatîyî
Rêberiya Şûreşê de Serleşker Emîn El-Hafiz bi hatina bîrwerîya heştê avdarê ve ji bona ser komekê ji pirsan date biaxivtin, ji yên ku ew bala Neşînvanarı di vê qonaxa mêjûyî de bi ser xwe ve didin bikişandin, ji yên ku welat di nava wan re tête biderbaskirin. Ji nava danavên li ser wan de hatîye bipeyivandin, pirsa Kêmatîyan û bi taybetî jî ve pirsa mîliya Kurd tête biderkevtin, ya ku ew di rastîya rastîyê de bi kêm ve ji pirsên dinî zindî nayête biderkevtin, ji yên ku balên piranîya pir ji cemawerên milet bi ser xwe ve didin birakişandin; jiber ku ew bi çarenûsa beşekî mezin ve ji Lawên miletê Surî de tête bigirêdan. Hêjîbêtir ji ber ku ew pir bi nebaşî ve ji bal Impiryalîyê û kevneperestîyê de tête bikaranîn, ya ku ew bi zîyana berjewendîyên welatîyî bilind ve û herwehajî bi ziyana berjewendîya miletên Ereb û Kurd ve tête biderkevtin.
Em didin bibawerikirin, ku Serdarên Berpirsiyar bi pêgîrî ve giringbûna vê pirsa hanê didin bitexmînkirin û ew dixwazin wê bidin biçarekirin, da ku aramî û yekbûna rêzên welatî bêtin bigirawkirin û

herweha jî da ku li rûwên pîlanên Impiryalîyê û Sehyonozmê de bête birawestandin, ji yên ku ew di nava van rojên hanê de ji hemû layekî de li dorhêla welêt de têtin bihûnandin. Ji alîyekî din jî de li ber çavan de pir bi diyar ve tête biderkevtin, ku bê kanî vê pirsa hanê çend derd li Iraqê de ji çendcarkirina tengavîyên abûrî, siyasî, diravî û herwehajî pêrejî tengavîya serdarîkirinê bi xwe jî ve dayite bidurustkirin.
Herwehajî pêrejî bê kanî çend ji bona ser serê welêt de ji destanan û derdan dayite bianîn, ji yên ku dê şopên wan bi derbasbûna dirêjbûna salan ve bêtin bihiştin. Cenga gemarî, ya ku têde di dirêjbûna du sal û nîvan de bira bira didate bikuştin, bes û bi tenha ve ew bi encamê
46Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
siyaseteke serserî ve û dûr ji şarezabûna rastîyê ve tête biderkevtin, ya ku ew ji bal desthilatîyên zaldar de di Iraqê de beramber bi miletê Kurd ve çi di pêla Ebdul-Kerîm Qasim de û çi jî di pêla serdarîkirina partîya Basî dihate biderkevtin. Vê siyaseta hanê bes' û bi tenha ve li dûxwe de ji bona miletê Iraqê de ji Ereb û Kurd de ceng, wêranîkirin, xwînrijandin û hêstirbaradnin date bihiştin. Rastîya jînê date biderxistin, ku wan nikaribûn xwe li ber serûştîya pirsa Kurd de bidin biliberxistin; jibervêjî ve ew li ser rêyeke rast de ji bona çarekirina wê pirsê hanê de bi şêweyekî durust ve nehatin bicûyîn, ya ku ew ligel berjewendîyê dihate bilihevkirin. Siyaseta wan xwe bi rengekî bingehî ve ji dilbijandineke şovînî ve û ji dîtineke b~n.::L1wazîyîtesk ve ji bona çarekirina kar û baran de didate bikanîkirin.
Hegerjî ku em vê nimûneya hanê jî li vê derê de didin bianîn,
ev nade biderxistin, ku em didin bibawerîkirin, ku dê kar û bar jî li nik me de di Surî jî de bi vî rengê hanê ve yanjî bi vî berê hanê ve bêtin biçûyîn; belam me ev nimûneya hanê date bianîn, da ku bête bidiyarkirin, ku serûştîya pirsê di nava herdu weletan de bi yek ve tête

biderkevtin û çarekirina wêna jî bi mîna hev ve tête biderkevtin. Evaya jî ji alîyekî de û ji alîyê din jî de jiber ku Serdarên Surîyi neha rêya çarekirina cengê bi baştirîn rê ve ji bona çarekirina pirsa Kurd ve li Iraqê de didatin bidîtin û herweha jî hêjîbêtir jiber ku wan bi rengekî kirdar ve û bi rast û durust ve di nava vê cenga gemarî de dane bibeşdarîkirin û ew bi destên xwe ve bi wan encaman ve hatin bigihandin, ji yên ku Hevalên wan li Iraqê de pê hatin bigihandin. Serweriya Serokê Civata Welatî ji bona Rêberîya Şûreşê di peyva xwe de bi diyar ve li ser hebûna pirsa milîyî Kurd de li Surî de neda bibiryarkirin; lêbelê heger jî ew pê bide yanjî pê nede bibiryarkirin, tevlivêjî de hebûna pirsa milîya Kurd di nava welêt de bi kar û barên diyar ve tête biderkevtin û rastî wê dide bineçarîkirin û herwehajî dîtina çarekirinekê ji bona wêna bi şêweyekî rast û durust ve ji wan kar û baran de tête biderkevtin, ji yên ku Merov nikare çavên xwe li ber wan de bide bigirtin, yanjî Merov wan di ser guhên xwe re bide biavêtin. Gava ku em li ser vî alîyê hanê de didin bidubarekirin; jiber ku miletê Kurd li Surî de di nava van çend salên dawî de tûşî siyaseteke azardanê û zordarîya milî bi rengekî kirdar ve tête biberamberkirin û heger kar û bar wetov bi vî rengê hanê ve bêtin

biçûyîn, dê bê gotin dijbûnên milî ji bona sînorekî bêtin bigihandin, ku di nava wan de hîç tu karapirsa welatîyî bilind dê neyête biderkevtin. Serwerîya Serleşker di peyva xwe de bi hebûna pêwendîyên mêjûyî di navbera miletê Ereb û kurd pê tête birûniştin, ku ew di pêlên xebata hevbeşî de di dijî Dujminên hevbeş de ji pêla Selah El-Dîn û tanî vê roja me jî de têtin bixurtkirin. Herwehajî Serwerîya wî dide bidubarekirin, ku divê li ser van pêwendîyên biratîyî baş û xurtkirina wan de bête biparastin. Belam ew pêrejî lê tête bivegerandin û giv û

tirasn dide bifirandin û dide bigotin, ku desthilatîyên serdar nikarin bi pêkhatina gewdeyekî milîyî Kurdî ve di welatê Ereb de pê bêtin birûniştin.
Em bi biramberî vê gotina hanê ve didin bigotin, ku biratîya Erebî - Kurdî di vê roja me de bi xurt û kêr ve tête biderkevtin, ku dê pir bi dijwarî ve li her her Merovekî de bête biderkevtin, ku ew vê rastîya mêjûyî bide binayînîkirin yanjî wê bikaribe bide biveşartin. Belam pir bi peroş ve tête biderkevtin, ku ev durujmê hanê bes û bi tenha ve di hatinan de tête bivegerandin yanjî tête bibilindkirin, di yên ku di nava wan de miletê kurd tûşî bela û destanên bi azar ve tête bikirin, da ku ew gotinên hanê jêre bi nala dilxweşkirinê û jibîrakirina der û birînanan ve bêtin biderkevtin.
Belam der barê xala duwem de, ya ku ew bi pirsa pêkanîna gewdeyekî milîyî Kurd ve di nava welatê Ereb de tête biderkevtin, ev pirsa hanê li jêr nav û nîşanên pir eudan ve hatîye bihatin, mîna ku têde "pêkhatina welatekî milîyî Kurd", yanjî "pêkhatina lsraileke Duwem", yanjî "Cihêbûn û Jêvekirina Perçeyekî ji Erdê Erebî de" û hin ji nav û nîşanên din de hatine bihatin. Em bi beramberî van nav û nîşanên eudan ve wetov têtin biçûyin, mîna ku Serwerîya Seleşker tête biçûyîn û em ligel bîr û bawerîya wina de têtin birûniştirı, heger ku bi rastî ve hin ji van pêrabûnên hanê ve bi rengekî pêgîrî ve bihata biderkevtin. Magelo Serwerîya Serleşker ne bi me re tête biderkevtin, ku ev nav û nîşanên hanê û ev danînên hanê bi carekê ve LÎ bi xwe ve di rastîya rastî de bi perdeyekê ve ji bona siyaseteke pîsî qirkirina bi komel ve beramber bi Kurd ve di Iraqê de tête biderkevtin û ya ku ew li ser miletê Kurd de di Surî de bi siyaseteke pîstirin zordarî milî û cudabûna rehperestî ve di vê dema me de tête bicîanîn? Herwehajî magelojî Serweriîya Serleşker û Endamên Civata Welatî ligel wî de

48Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
didin bibawerîkirin, ku ev siyaseta bi beramberî Kurd ve bi karhatî ve di nava van salên dawî de çi li Surî de û çi jî li Iraqê de dê bikaribe pêwendîyên biratîyê di nava Ereb û Kurd de bidin bixurtkirin, yanjî dê ew wan pêwendîyan ji bingeh ve bide birakirin? Magelo ev berpirsiyarîya hanê bi ser şanê kê ve tête bikirin?
Debera em pirsê li Iraqê de ji- bona rexekî de bidin bihiştin, da 'ku Xwediyên wê ji xwe re wê ji serdarîya Iraqê û miletê Kurd bidin biçarekirin. Em ji xwe re li vê derê de pirsê li Surî de didin biwergirtin û em li dû pêşkevtina wêna de têtin biçûyîn û tanî kîjan radeyekî ligel vê pêş kevtina hanê û pêwistîyên biratîya Ereb - Kurd de li gora ber welatîyî bilind de û herwehajî têde ligel berjewendîya milîbûna Erebî de bi xwe ve tête bilihevkirin.
Di pêla serdarîkirina partîya Basî de li Surî de ji avdara sala 1963de tanî avdara sala 1964 de ev rûdanên tên van rastîyan didin biderxistin:
Endazîya Kurd di karmendîya kar û barên perwerdekirinê, fêrkirinê û)Şungerên Mamostan) de di pêla serdarîkirina partîya basî de bi gelekî ve bi kêmtir ve ji zîneta berî serdarîkirina wan ve tête biderkevtin.
Wetovjî Merovekî pir sade dide bibawerîkirin, ku her Kesekî di van karmendîyan de tête binîşankirin, divê ku ew him bi Basî ve yanjî bi Mebahisî ve -bi Sîxor ve, Cuma- bête biderkevtin.
Jimareke pir ji Karmendên Kurd ji karmendîyêrı wan hate biderkirin, ji yên ku ew nehatin biderkirin, ew ji karkirinê de di nava heremên Kurd de hatin bibêpişkkirin û ew ji bona nava heremên dûr hatin binardin.
Xwendevanên Kurd ji bi destkevtinên xwendinê ve li derve de hatin bibêbeherkirin û herwehajî wergirtina wan di nava fêrgehên Mamostan de nikare bête bikirin, tanî ku li jêr ezmûmeneke siyasî de

neyêtin biderbaskirin, bi bêyî ku li notên wan de yanjî li karina wan de bête bitemaşekirin.
Jimarek ji Kurd ji karê serbaziyê hatin biderkirin û jimarek ji wan jî di piştî wergirtina wan de di kolêca fêrkirina serbazîyî hîlanînê de di demekê de bi bê derxistina tu hoyekî ve ji wan re hatin biderkirin. Hîç Lawên -Kurd di Kolêcên Serbazîkirinê .de nayêtin biwergirtin, bes û bi tenha ve jiber ku ew bi Kurd ve têtin biderkevtin.
49
dam Û destgehên tomarîkirina bajarî bi carekê ve zayînên Kurd nadin bitomarkirin, ji yên ku navên wan bi navên Erebî ve nedihatin biderkevtin.
Li ser Kurd de hate biqedexekirin, ku ew bi rabûn û rûniştên xweyî milî ve yanjî bi reweştên xweyî taybetî ve ji bona nimû ne pêrabûna bi Cejna Newrov ve bêtin birabûn, ya ku ew bi cejna wanî milî ve tête biderkevtin. Bi sedan ve ji law û Kecên Kurd ve ji bona girtîyên seradbên Polisê veşartî hatin biajotin, ew hatin biazaradan û bi dehan ji wan ve ji bona ber dadgehên parastina milî û zinadanan de hatin biajotin. Evjî her sal bi vî corê hanê jî ve di Cejna Newroz de dihate bivegerandin û her sal bi sal ve hêzên Polîs ji bona nava gundên Kurd dihatin birêkirin, da ku ew nehêlin, ku Kurd bi wê Cenja xweyî milîyî pîroz ve bidin bişahîkirin.
Desthilatîyan pêrabûnên ji rêderkevtî ve di herema Cezîrê de ji xwe re datin biwergirtin, da ku ew derkirina jimareke mezin ji Neşînvanên Kurd ji welêt bidin biamadekirin; piştî ku ew wan ji Neşînvanîya Surî de bidin birûtkirin û danîna her Yekî tomarkirî di nava tomarên bajarî de ji sala 1924 de bi ne Surî ve bidin bidanîn û wan bi .Kevtî" ve yanjî bi .Penabinde" ve bidin bidanîn.
Bi alîkarî û bi navtêda serdarîyê ve hinek ji Şêxên Şemeran

nala Deham El-Hadî ji bona talankirina erdên Cotkarên Kurd di sê gundan de di Cezîrê de gundê Şebek, Abire û Kevirê Dena datin bidestpêkirin û herwehajî ji bona kuştina çar Cotkaran û birîndarîkirina çarên din ji wan jî dane bikirin, bêyî ku hîç qanûn wan bide bixwestin yanjî ku ji wan beramberî dadgehê ve bi tawanbarîyên xwe ve bêtin bipirskirin.

Bi sedan ve ji Kurdan ve tûşî girtinê, zindankirinê û li dû gerandînên siyasî de hatin bikirin; ev jî bes û bi tenha ve jiber hesta wanî milî, yanjî jiber rawestandina wan di rûwê zordarîyê de hate bikirin, ji yên ku ew ji bal wan de dihatin birûkirin. Dadgehên Parastina Milî li ser piranîya wan de dadkirinên zordarî di navbera şeş mehan û sê salan de datin biderkerin. Hêjî tanî nehajî pir ji wan jî li ber wan dadgehên hanê de têtin bidadkirin û bi dehan jî ve ji nava malên xwe ve bi derkevtî ve têtin bidîtin û ew ji bal qanûnê de jiber wan hoyên jorî de têtin bixwestin.

50Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

Di pir hatinan de mîna destpêkirina Şûreşa Kurd di Iraqê de, herwehjî di hatina ahengên Cejna Newroz de ji bal Kurdan de û hatinên din de serdarîyê pêrabûnên ji rêderkevtî û zordarî ve bi dijî Kurd ve date biwergirtin û herwehajî wê pêrejî wê çûn û hatin di nava hin ji gundên kurd date biqedexekirin. Xelkên van gundan bi rojan ve li jêr tirsê û zordarîyê de dihatin bijîyandin. Di nava van pêrabûn û hêrîş ên hanê de tevaya xelkên gundekî yanjî pir gundan di yek carê de dihatin bigirtin, ji yên ku ew tevde bi hev re tûşî azardaneke hovberî di serdabên Mebahisan -Polisêrı Veşartî- û zindanên wan de dihatin bikirin.

Peyên Mebahisan -Polisên Veşartî- bi taybetî ve di nava heremên Kurd de tirs û dirbûn beramber bi Neşîrıvanên Kurd ve ji

Cotkaran, Zanevan û Xwendevan ve didatin bibelavkirin. Girtina kêfdarî di nava wan de dihate bibelavbûn û herwehajî lêdanê, piskirinê û tufkirinê di nava serşeqamnên heremên Kurd de xwe didatin bibelavkirin û ev jî bi taybetî ve di herema Efrîn, çiyayê Kurd û Serê Kanîyê de di vê dawîyê de xwe didate bibelavkirin.
Bes û bi tenha ve dîtina nivîstekê bi zimanê Kurdî ve li nik her Merovekî de, hegerjî çi jî ba rengê wê nivîstê jî bihata biderkevtin, hegerjî Elfeba jî bihata biderkevtin, ew bi tawankarîyekê ve beramber bi wî Merovê hanê û çarenûsa wî ve dihate biderkevtin û ew ji bona ber Dadgehên Parastina Milî ve dihatin biajotin; piştî ku ew di nava azardan eke hovberî de di jêr zindanên Mebahisan -Polîsên Veşartî- de dihatin biderbaskirin. Wetov bi vî rengê hanê ve siyaseta kuştina çanda kurd der barê miletê Kurd de bi xurtî û hovîtî ve dihate bicîhatin.
Heremên Kurdî û nemaze herema Cezîrê tanî neha ji hemû alîyên avedanîyê û çakkirinê ve û herwejaî ji alîyê pêşkeşkirina kar de ji bona milet di warên civakî û tendurûstîyê de di ser guhan re hatine biavêtin û tu pêt bi wan ve nehatine bikirin, vê jî date bikirin, ku nexweşî di nava wan de û nemaze nixweşîya janazirav bi rengekî mertirsî ve hate bibelavkirin. Bi sedan ji Zarokan ve di her sal de bi nebûna guhpêdana tendurustî ve ji bona wan ve bi rnirîna wan Neşînvanan ve tête biderkevtin.
51
Ev hindikên ji gelekan ve ji rengên zordarîyê û siternbarîyê têtin biderkevtin, ji yên ku ji bona wan miletê Kurd li Surî de tête biberamberkirin. Di piştî vê re ligel me de ne Serwerîya Serleşker û nejî Endamên Civata Welatî ji bona Rêberiya Şureşê de didin bilihevkirin, ku siyseteke wetov tête biderkevtin, bes û bi tenha ve

Merov dikare wê bi siyaseteke cudabûna rehperestîyê ve bide bipesinandin. Magelo ev siyaseta hanê di nava serê Serweriya Serleşker û Civatê de ligel bîr û bawerîya biratîya Ereb - Kurd de, ligel pêwendiyên mêjûyîyî baş-de di navbera herdu miletên Ereb û Kurd de tête bilihevkirin? Magelo Merov dikare vê siyaseta hanê beramber bi miletekî ve bi bê afirandina mehnan û hoyan ve pê bête birabûn? Gava ku merov bide bigotin, ku ew dixwaze ji xwe re di.welatekî milî di nava erdê Ereb de bide bidurustkirin" yanjî ku ew ji xwe re dixwaze "dewleteke Israilîyî duwem bide bidurustkirin" û herwehajî gelek ji van derewên hanê têtin bigotin.
Heger ku ev siyaseta hanê, ya ku ew ji bal serdarîyê de beramber bi miletê Kurd ve di Surî de di vê dema neha de tête biderkevtin, bi nala çarekirinekê ve û bi rêyeke hel bijartî ve ji bona pirsa Kurd ve tête biderkevtin, di bîr û bawerîya me de tête biderkevtin, ku serdarî beramber miletê Kurd de di Surî de pir di texmînên xwe de têtin biderkevtin, jiber ku ev siyaseta hanê nikare bidebiçarekirin, hêjîbêtir ew dê pirsa Kurd bide bidijwarîkirin û di vê siyaseta hanê de bi tu rengekî ve ne berjewendiya bilindî welatî û nejî berjewendîya rnilîbûna Ereb tête biderkevtin; mîna ku rûdanên li Iraqê de ev rastîya hanê dane biderxsitin û pêrejî dane bixuyanîkirin, ku hîç bi tu rengekî ve nikare di vê serdema me de miletek bête biqirkirin, hegerjî ku pêrejî dest ji bona qirkirina bi komel jî ve bête biavêtin.
Di bîr û bawerîya me de tête biderkevtin, da ku çarekirin bi rast ve û bi dadwer ve bête biderkevtin, divê ew çarekirina hanê bi demokrasî ve bête biderkevtin û divê ew pir dûr ji dilbijandina şovînî ve û ji bîr û bawerîya zordarîyê ve bête biderkevtin. Herwehajî divê ew ligel canê biratîya Ereb - Kurd de ji rexekî de bête bilihevkirin û ji rexekî din de divê ew ligel peymana Yekkirtina Netewan û bendên

Mafeyên Merov de bête biderkevtin. Bi bingehî ve divê ew çarekirina hanê ligel binghê siyaseta bi carekê ve bi mîna hev ve di nava Ereb û Kurd de di mafeyan û erkan .de û di reftarîkirinê de bi bê hîç
52Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
cudabûnekê û jihevparevekirinekê ve bête biderkevtin. Herwehajî ew çarekirina hanê divê xwe ji her rengekî ji regên "daqurtand inê" yanjî "bijavtinê" bide bidûrkirin. Ji alîyekî din de divê ew çarekirina hanê bi rengekî bingehî ve dergehên karînên bi karkirî ve li ber vî miletê hanê de bide bivekirin, da ku ew bikaribe bi çanda xweyî milî ve çi ji ziman, wêje û huner de pê bête birabûn û wê bikaribe bide bipêşvexistin û ne ku ew di nava xwe de bîr û bawerîya "kuştina çanda wî" bide bihilgirtin; jiber ku di kuştina çanda miletekî de dikare kuştina miletekî bi xwe ve bête biderkevtin.
Miletê Kurd pir pêt pê dide bikirin, ku ev bîr û bawerîyên hanê di destûra demê de bêtin bicîkirin, ya ku jê re Civata Welatîyî ji bona Rêberiya Şûreşê ji bona amadekirina wêna dayite bikarkirin û ya ku ew xwe li ber derkevtinê de dide bidîtırı, mîna ku hin ji Berpirsiyaran de didin bigotin; jibervêjî ve divê ew wan bîr û bawerîyên siyasîyî karîkirî bide bimirêkkirin, yên ku divên ew di karkirinê de beramber bi Kurd ve bêtin biderkevtin.
Di warê abûrî û civakî de Neşînvanên Kurd li Surî de pê didin bipêtkirin, ku desthilatî guhpêdaneke bi taybetî ve ji bona heremên Kurd bidin bidan; jiber ku ew heremên hanê tanî neha di pişt guhan re hatibûn bixistin û herwehajî jiber ku ew bi navînîyên abûrîyî jîndarî ve di nava welêt de têtin biderkevtin.
Çarekirina pirsê bi çarekirineke demokrasî û rast ve dikare cihê dewletê di warên siyasî û abûrî de bide bixurtkirin û ew dikare kuneke mezin bide bidadan, ya ku têre pîlanên Impiryalî dikarin xwe bidin

biderbaskirin, herwehajî ew dikare bi kêrdarekî xurt ve ji bona aramîyê di nava hundur de bête bikirin û weha ew dikare bi alîkarîya biyekkirina rêza welatî ve bête biderkevtin, da ku ew bi beramberî metirsîyên Impiryalîyê û Sehyonîyê ve bête birawestandin. Bi vî rengê hanê ve dê dewlet ji alîkî din de dildarîya miletê Kurd li Turkî, Iran û Iraqê de ji xwe re bide bi wergirtin û herwehajî dê ew ji xwe re dildarîya bîr û bawerîya cîhana demokrasî jî bide biwergirtin.
Bi vê hatina hanê ve divê em nedin bijibîrakirin; lêbelê divê em bidin bibîrxistin, ku miletê Kurd di Surî de bi guhpêdana xwe ve bi van pirsên xweyî milî ve dide bixwestin, ku ev pirsên hanê dê ji alîyê desthilatiyan de guh bi wan ve bête bidan, herwehajî guhpêdana wina ji bona van pirsan û derdên hanê de guhpêdana wîna ji bona pirsa

demokrastîyê bi giştî ve nikare bide bidûrkirin. Jiber ku miletê Kurd dide bibawerîkirin, kuhemû pirs û derdên welêt dikarin çarebûna xwe bes û bi tenha ve di bin sîbera serdarîkineke demokrasîyî rast de bidin bidîtin, gava ku miletê Surî bi giştî ve bi xwedanê azadîyên xweyî demokrasî, sîyasî û civakî ve bête biderkevtin.
Derbarê parastîna serxwebûna welêt û serwerîya wî de dê mîna hercar bi baştirîn Berxwedan ve ji bona vê serxwebûnê û vê serwerîya hanê de bête bimayîn û herwehajiî dê miletê Ereb di wî de ji xwe re her û her bi baştirîn Alîkar ve di tarîntirîn û hesttirîn zênetan de bide bidîtin. Herwehajî dê 1i ser tehta biratîya Ereb - Kurd de her û her pîlanên Impiryalîyê, Sehyonîyê û Kevneperestîyê bêtin bitarûmarkirin.
Gava ku partîya Demokratî kurd li Surî de vê nameya hanê ji bona Civata Welatî ji bona Rêberîya Şûreşê dide bipêşkeşkirin, ew dide bihêvîkirin, ku dê ew li nik Berpirsiyarvanan de guhpêdaneke pêgîrî ji bona çarekirina vê pirsa hanê de bide bikirin; jiber ku di

çarekirina wêna de di vê pêla hanêyî mêjûyî û hestyar de, ji ya ku welat di nava wê de tête biderbaskirin, giringbûneke mezin tête biderkevtin. Herwehajî jiber ku çarekirina vê pirsa hanê bi vî berê şaş ve dê encamên pir giranî nebaş bi ser berjewendîya welatî giştî ve bide bianîn.

Silav ji bona we

5.5.1964

Partîya Demokratî Kurd li Surî de"

Gava ku Merov ji xwe re neha li navroka vê nameya hanê de bi wird û kûr ve di mirêka dema wê de lê dide bitemaşekirin, Merov têde him bedbextîya Kurd û himjîbêtir bedbextîya miletê Ereb jî ji xwe re di encamê dawî de dide bidîtin. Partî di vê namneya xwe de pir bi nermî ve û himjîbêtir li ser xwe de pirs bi birs ve li ser dide binivîsandin û ji serdarîya Surî û Berpirsiyarên wê re bi nermî ve dide bixwestin, ku ew dev ji wê siyaseta şovînî ve beramber bi miletê Kurd de bidin biberdan û herwehajî ew ji wan dide bixwestin, ku pirsa Kurd li ser berjewendîya miletê Ereb û Kurd de bidin biçarekirin; jiber ku ew siyaseta şovînî nikare rojekê ji rojan pirsa miletê kurd bi wî corî ve bide biçarekirin.

54Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

Herwehajî divê li vêderê de em li ser bingên rastîyên vê nameya hanê de tevaya siyaseta Şovînî û Basîyî faşî beramber bi Kurd ve him li Kurdistana iraqê û himjî li kurdistana Surî de bi ber çavan ve bidin bixistin û hêjîbêtir zîyana wêna him ji bona miletê Kurd û himjî ji bona miletê Ereb de di ayinde de li ser serpêhatîyên mêjûwê de bi vî rengê hanê ve bidin biderxistin:

Dostanî di nava miletan de bes û bi tenha ve dikare li ser bingehên berjewendîyên hevbeş de û di tirazûkirîna wan de ne di

Min pêwndî ligel Dost û Hevalan xwe de date bikirin.
Herwehajî min pêwendî ligel Qedrî Cemîl Paşa jî de date bikirin. Me hevdû li Mercê de date bidîtin û em ji wir bi çend gavan ve ji bona çayxana Abu Kemalî Zivistanî ve hatin biçûyîn. Dunya pir germ bû, çilê havînê bû. Me ji xwe re çayê û qehwe date bixwestin. Qedrî Cemîl Paşa pir kêfa xwe bi ditîna min ve date bianîn, jiber ku me hevdû bêtir ji neh salan ve nedabû bidîtin.
Qedrî Cemîl Paşa yekek ji gewretirîn, zanatirîn û bi nav û bangtirîn Welatperwerên Kurd ve di Kurdistanê de dihate biderkevtin", Wî bîrwerîyên xwe di nivîsta Zinarê Silopî de bi zimanê Turkî ve dayite binîvasandin û ew nivîsta hanê ji bona zimanê Kurd jî hatîye biwergerandin". Ew bîrwerîyên wî pir bi nerx ve têtin biderkevtin; jiber ku ew di hemû rûdanên dema xwe de bi jêhatîbûn ve

21Ji xwe re li ser Qedrî Cemîl Paşa de li nîvîsta .Xoybûn" de ji bal Mihemedê Mele
Ehmed de,ji wergerandin wêyî kurmancî deji bal Keça Kurd de, di r. 130 - 137 de,
çapa yekemî Şamê de di 15. 1. 1993 de bidin bitemaşekirin.

22Nivîsta Qedrî Cemîl Paşa bi zimanê Tukrî ve lijêr vê navnîşana hê de :Zinar Silopî

"Doza Kürdüstan, Kürt milletinin 60 senbenderi esarettin kurtuluş savaşi hatirati,
Beyrouth 1969 hatîye biderkevtin.
78Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
bi beşdar ve dihate biderkevtinû wî bi tavaya dil û canê xwe ve pişta şureşa Kurdistana Iraqê didate bigirtin û Barzanî bi dil û cergên wî ve dihate biderkevtin.
•Qedrî Cemîl Paşa ji min re li ser rewşa Kurd de li Ewroapa de date bipirskirin: Rewşa we çawan tête biderkevtin; çi Ewropî li ser Kurd de didin bigotin û çilo hûn kardikin?
Min jê re li ser wan pirsên wî de pir bi dûr û dirêjî ve date biaxivtin û weke ku neha bi bîra min ve tête bikevtin, min wetov jêre date biaxivtin:
Li Ewropa Rojava de jimara kurdan tanî salên çilî jî ji vî sedsalê me pir bi kêm ve dihatin biderkevtin. Li vir u dera hanê. de çend Xwendevan yanjî çend kes dihatin biderkevtin. Lêbelê di salên pêncî de Xwendevanên Kurd bi çûna xwendînê ve li Ewropa de dane bidestpêkirin û der sala ı956 de KO]TIelaXwendevanên Kurd ji çend Kesan hate bipêkhatin. Ji wê rojê û pêve careke din ji nû ve dengê Kurd û Kurdistanê li seranserî Ewropa de piştî xebata Bedirxanîyan di berî cenga cihaniyî yekem de û xebta Şerif Paşa û Hevalên wî di Kongirê Sêver de der sala 1920 de bi şêweyekî rêxistî ve hate bibilindkirin. Tev li vê rûnada pêkhatîna Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de pêkhatineke din li Ewropa de hate bipêkhatin, ku kêra wêna ne bi kêmtir ve ji kêra Komela Xwendevanên Kurd de dihate biderkevtin. Ew jî bi Rêxistina Partîya Demokratî Kurdisatan ve tête biderkevtin, ya ku ew li Ewropa de di reşmeha sala ı960 li bajarokê Planeg de li nêzîkî Monîx de li Elmana Federalî de hate bipêkhatin.

Tevaya Kurdan û bi Xwendevanên xwe jî ve bigir di vê demê de li Elmanya Federalî de bi şêst tanî heftê kesî ve dihatin bigihandin.jiber ku Bêganên di Elmanya Federalî de di vê demê de hemû bi sed hezar kes ve nedihatin biderkevtırı."

~J Di dema cenga cîharıiyi duwem de 7, 5 melyon û nîv ji Dîlên cengê û Karkerên bi
zorani ve li Elmanya de di karxanên Elmanî de bi darê zorê ve didane bikarkirin. Di
vê roja meyî neha de careke din di sala 1999 de bigir bêtir ji 7, 5 Bêgane li Elmanya
de têtin bijîyandin û piranîya herî pir ji wan didin bikarkirin. Ji van jî li gora amara
Elmanî de nêziga ji 600000 Kurd li Elmanya de têtin bijîyandin. Ji van jî bêtir 90%
Kes ji Kurdistanê Turkî de têtin biderkevtin, ji yên ku ew ji bona Elmanya Federalî
di pişti sala 1963 de pişti lêkirina dîwarê Berlin ji bona karirinê hatibûn bihatin û ew
bi destên gulan ve ji bal Elmanan de dihatin bipêşewazîkirin û ew di piranîya xwe
79
Hemû Kurdên li Ewropa de ji seranserî Kurdistanî jî de ew di
vê rêxistina hanê de bi Endam ve dihatin biwergirtin. Hemû Endamên Hizibî Demokratî Kurdistana Iranê û hemû Endamên Partîya Demokratî Kurd li Kurdistana Surî jî de ji ber xwe ve bi Endam ve di vê rêxistina hanê de dihatin biwergirtin. Wetov di nava vê rêxistina hanê de hemû Kurd ji herçar perçên Kurdistanê de dihatin biderkevtin. Vê rexistina hanê pir bi başî ve rêxistina rêberîya Komela xwendevanê

Kurd li Ewropa de didate bikirin û tevaya kar û barên Komelê bi ser milên xwe ve li seranserî Ewropa de didate bihildan; jiber ku kar û bar li Ewropa de dûr yanjî nêzîk bi navê komelên cemawerî dikarîbûn bêtin bikirin. Ji salên şêstî de û piştî vêkevtina şureşê li Kurdistana Iraqê de der sala 1961 de tevaya Kurdan bi carekê ve bi dil û can ve ji bona gihandina dengê vê şureşa pîroz bi milet û dewletên Ewropî ve bi hev re didatin bixebatkirin. Iro bigir li seranserî Ewropa de liqên de bi Kurmancî didin biaxivtin û yên mayî bi Dumilî didin biaxivtin. Herwehaji nêzîka 70 000 ji wan Kurdên li Elmanya de ji Kurdistana Iraqê de hatine bihatin û piranîya herî pir ji wan bi Penahinde ve têtin biderkevtin, ji yên ku piranîya wan Eleman her roj dixwazin wan ji bona nava welatên wan bidin bivegerarıdin.

Herwehajî ji van Kurdên li Elemanya de 40 000 Kurdên Yezîdî têtin biderkevtin, ji yên ku ew jî hemû bi Kurmancî ve didin biaxivtin. Bes û bi tenha ve ji bona nimûne li bajarê Berlinê de di paytextê Elmanya de bêtir ji 48 000 Kurd têtin bijiyandin,

Neha li seranserî Ewropa de bigir yek melyon Kurd tête biderkevtin û ji wan careke din 90% ji Kurdên Kurdistana Turkî de têtin biderkevtin û piranîya wan jî ji xwe re di nava welatên Ewropî de didin bikarkirin û yên mayî di nava Kurdên Kurdistana

Iraqê, Iranê, Surî têtin bibelavkirin û herwehajî di nava van Kurdên Ewropa jî de hin
ji Kurdên Libnanê jî têtin bidîtin. Bigir bêtir 95% ji hemû Kurdên li derveyî Kurdistanê de bi Zaravayê Kurmancî ve didin biaxivtin. Ev parvekirina zimanî di
nav Kurdan de li Ewropa de roleke pir mezin ji bona pêşvexistina Zarvavayê
Kurdmancî dide bilîstin; jiber ku li Kurdistanê de zaravayê Kurmancî bi xurtî ve ber
li ber de li Kurdistana Turkî, Iranê û Surî de tête bigirtin û hêjîbêtir bi xurtî jî ve şerê
wî tête bikirin, da ku Turkkirin, Iranîkirin û erebkirina Kurdan di rêya qedexekirina
zimanê wan de bidin biserxistin; jibervêjî ve zaravayê Kurmancî li Ewropa de pir
gavên mezin jî ji bona geşbûna xwe de dide biavêtin û ew bi zaravaya bigir bi tenha
xwe ve tête biderkevtin, yê ku ew di zanistgehên Ewropî û derveyî Ewropa de tête
bixwenekarîkirin. Di seranserîya Kurdistanê de 75% ji miletê Kurd bi zaravyê
kurmancî ve dide biaxivtin û bes û bi tenha ve 25% ji Kurdan bi zaravayê soranî ve
didin biaxivtin.

80Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

Komela me û herwehajî partîya me têtin bidîtin. Pêwendî pir bi xurtî
ve bigir li hemû zanistgehên Ewropî de ji nasîna pirsa Kurd û
piştgirtina wîna tête bikirin. Pir belavok, Rojname, Kovar bi zimanên

Ewropî cudan ve li ser Kurd û pirsa wî de di seranserî Kurdistanê de têtin biderkevtin. Pir semînar û civîn li bajarên Ewropî de li ser Kurd û Kurdistanê de têtin bilidarxistin. Pir bi bîrxistin ve ji bona Serok û Padtîşahên dewlatên li Ewropa de li ser pirsa Kurd de di seranserî Kurdistanê de têtin birêkirin. Herwehajî ew bibîrxistinên hanê jî ji bona Yekgirtina Netewan û rêxistinên wê de têtin binardin. Hêjîbêtir pênwendîyên pir xurt ligel Xwendevanên Cihanê de têtin bikirin, jiber ku Komela me ji sala 1964 de bi endamê Yekitîya Xwendevanên Cihanê ve tête biderkevtin. Pêwndîyên meyî xurt ligel Yekîtîya Xortên Demokratîyî Cîhanê de têtin biderkevtin û herwehajî ligel hemû Komelên cemawerî li seransrî Ewropa de pêwendîyên me bi xurtî ve têtin biderkevtin. Em bigir bi navê Komela xwe ve di hemû civînên Xwendevanan de ji welatî de yanjî navnetewî de têtin bibeşdarîkirin. Herwehajî em li hemû Mehrecanên Yekîtîya Xwendevanên Cihanî û Mehrecanên Yekitîya Xortên Demokratîyî Cihanî de têtin bibeşdarîkirin. Herwehajî sal bi sal ve em li seranserî Ewropa de bi Cenja Newroza xweyî perest ve têtin birabûn. Di nava van jêhatîyan de bi carekê ve her û her li ser pirsa Kurd de di seranserî Kurdistanê de tête biaxivtin û Miletên Ewropa li ser rewş û zinetên Kurdistanê de têtin biagehdarîkirin û piştgirtaina miletê Kurd di Kurdistanê de ji wan ji bona xebata wîyî milîyî rewa di rizgarîkirina wîna de ji bin sitemkarî û zordarîya dewletên Dagirkerên Kurdistanê ji Rom, Ereb û Ecem de didin bixwestin. Sal bi sal ve Kongirê Giştîyî Komela me li Eropa de tête bigirtin, ku ew bi xwe jî ve bi xwe ve bi pêşeden.eke mezin ve ji bona piştgirtina miletê me tête biderkevtin; jiber ku hemû biryar û belgeyên siyasîyî wan Kongiran li ser rewş û zinetên hemû perçên Kurdistanê de bigir bi zimanê hemû miletên Ewropî ve têtin biwergerandin û bibelavkirin. Wetov ji bona nasîna miletê me û

pişgirtina wîna ji bal bîr û bawerîya Ewropî de pir dilê Kurdan pê tête bixweşkirin û hêjîbêtir roj bi roj ve hêvîya wan di rizgarîkirina Kurdisrtanê de tête bigeşkirîn û bixurtkirin. Navê Kurd û Barzanî li asûwê esarnnê Ewropa de bi hev re têtin biderkevtin û biberzkirin. Miletên Ewropa Kurd bi Braznî ve û Barzanî bi Kurd ve didin

binaskirin Û ew herdu bi cêwî ve têtin biderkevtin û ew ji hev nayêtin bicihêkirin. Şureşa Kurd li Kurdistana Iraqê de di bin rêberiya Barzanî de pir cihekî wêyî bi hêja ve li nik bîr û bawerîya miletên Ewropî de tête biderkevtin; jiber ku Barzanî pir li ser xwe de bi şêweyekî pir rewa ve û demokrasî ve ji bona daxwaza mafêyên miletê xweyî dadwer de dide bixebatkirin, Tevaya miletên Ewropî pir daxwaza Barzanî ji bona Demokrasî ji bona Iraqê û Ewtonomî ji bona Kurdistanê bi dilê xwe ve didin bidîtin. Ev nermbûna hanê û şêweyê xebata rewayî miletê Kurd di Kurdistana iraqê de pir dilên miletên Ewropa bi ser xwe ve dide birakişandin û ew bi çavê Rêberekî mezin ve li Barzanî û rêberîya wî de didin bitemaşekirin û rêzê û hejabûnê jêre didin bigirtin; çend ew nefrtê ji reftarî Felestîyan de di karên wanî Teroristî de didin bigirtin, weha deha ew reftara Barzanî ji bona xebata rizgarîkirina milî di Kurdistanê de di dadwerîya wê de bi nimûne ve didin bidîtin.

Siyaseta Kurd li Ewropa de pir li ser xwe de, bi nermî ve û hêjîbetr bi carekê ve li ser bingehê demokrasiyî û mafeyê Merov de tête bikirin. Me rojekê ji rojan ne bi dijî miletên Turk, Ereb û Faris ve dayite bikarkirin; lebe1ê em her û her ji bona Dostanîya wan de li ser bingehê çarekirina pirsa Kurd de di mafeyê çarenûsa wî de didin bixebatkirin. Her û her me durujmê dostanîyê ligel wan miletan de dayite bibilindkirin û em dibêjin, ku azadîya me Kurdan bi azadîya

van milatan ve tête bigirêdan û herwehajî azadîya wan miletan jî bi azadîya Kurdan ve tête bigiredan. Jibervêjî ve pir kêfa miletên Ewrop him ji bona Baraznî û him ji bona Kurdan di xebata wanî rewayî milî de ji bona rizgarîkirina Kurdistanê tête bidîtin.
Gava ku min ev gotinên xweyî hanê datin bidawîkirin, Mamê minî pîrê serboz pir bi germî ve dest bi bigirî ve date pêkirin. Min dêhna xwe pê date bidan û bi lez û bezek pir bilind ve min tevaya bîr û bawerîyên xweyî gotî bi carekê ve ji nû ve di nava serê xwe de datin bivegerandin, magelo min di nava wan de tu tiştekî weha bi dilşikestî ve ji vî mamê xweyî Pir re dayite bigotin? Piştî lêvenerandineke bi lez û bez ve ji bona wan bîr û bawerîyên gotî de min tu tiştekî bed têde ji bona mamê xweyî Pîr nedate bidîtin. Hêjî wî girîyê xwe didate bikirin. Dorhêla me li me de didate bitemaşekirin û wan ev girêyî vî Pîr.ê hanê ji xwe re didatin bidîtin. Min ji xwe re didate bigotin, magelo dê ev
82Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Çavdêrên me çi li ser vî girêyê Pirê hanê de bidin bigotin? Gelo dê ew nebêjîn, bi ka min çi xeberek nexweş ji vî Pîrê hanê re dayite bi gotin? tanî ku ew weha ji xwe re dide bigirîkirin? Pir pirs di nava serên min de dihatin û diçûn; lêbêle hîç bersiveke hişmendî min nikarîbû ji bona wan pirsan li ser vî girêyê hanê de ji xwe re bida bidan. Min jî weha ji xwe re mîna Çavdêrên din li Qedrî Cemiîl Paşa de didate bitemaşekirin. Wî têra xwe ji xwe re date bigirîkirin. Di pişt re wî bi destmala xwe ve hêstirên çavên xwe dane bipaqijkirin û çend keserên kûr jî ji xwe re datin bikişandin. Wî li min de date bimeyzekirin û ji min re date bigotin: Birazî tu dizane çima ez giryam? Min bi lez û bi bez ve di nava dilê xwe de didate bigotin, ma dê ezê ji kû bidim bizanîn? Min jêre date bigotin, na ez nizanim, çima te date bigirîkirin? Careke din wî keserên kûr ji xwe re datin bikişandîn û wî ji min re

date bigotin: Birazî ez ji kêfa re giryam. Her tişt bi bîra min ve dihate biderkevtin; belam girîyê wîna ji kêfare bi bîra min ve nedihate bikevtin. Min deynekir. Wî date bigotin. Birazî! Ez der sala 1937 de ji xwe re li Ewropa de dihatim bigerandin. Bigir kesekî nizanîbû, bê ka Kurd çi kesekin û heger wan navê wî jî ji xwe re bidana binaskirin, bes û bi tenha bi nala Serbiran, Çetan, Keleşan, Mêrkûjan, Rêbiran, Dizan ...ûhd. didatin binaskirin. Ez li bajarê Lozanê de li Siwêsra de ji xwe re li mêvanxaneyekê de hatibûn bipeyabûn û min ji xwe re li wêderê de didate bixewkirin. Danê sibehê ez ji jora xwe ve ji bona aşxanê hatim bidakevtin, da ku ez taştîyê ji xwe re bidim bixwarin. Hemû mêz xelk li ser wan de dihatin bidîtin. Mêzek vala nidihate bidîtin, Her mêzek yek kes yanjî bêtir li ser de dihatin birûniştin. Min çavêbn xwe li mêzeke piçekî vala de date bigerandin û min yek mêz bi yek neferî ve date bidîtin. Ez ji bona wê mêza hanê hatim biçûyîrı û min ji Rûnişvanê wê re date bibiprskirin: Ma vê derê bi vala ve tête biderkevtin û ez dikarim ji xwe re li vêderê de bêtim birûniştin? Ciwanmêr ji min re date bigotin: belê ew der bi vala ve tête biderkevtin û tu dikare ji xwe re lê bête birûniştin. Ez rûniştim û min jî ji Navmalîyê mêvanxanê de bi zimanê Firensî ve daxwaza taştîya xwe date bikirin. Hêjî taştîya min nehatibû, Beramberî min ji min re date bigotin, magelo ez dikarim ji te bidim bipirskirin, ku hûn ji kîjan welatî têtin bihatin? Min jê re date bigotin: Ez nadim bibawerîkirin, ku tê bide bizanîn; lêbelê tu dikare navê çend welatan bide bigotin.

83

Beramberî min pir bi Merovekî li ser xwe ve dihate biderkevtin û wî ji min date bipirskirin: tu ji Italya ye, min jêre got, na, ez neji ıtalya me. Wî ji min re got: tu ji Romanya ye, min jêre got, na, ez ne ji Romanya me. Wî weha careke din li min de pir bi wirdî ve date bitemaşekirin û

date bigotin: ma tu ji Yunanê ye, min jêre careke din got, na, ez ne ji Yonanê me. Wi date bigotin, Ez êtir nema dizanim, bê kanî tu ji kû derê ye? Min jê re date bigotin: ez Kurdim û ji Kurdistanê me. Gava ku min navê Kurd û Kurdistanê jêre date bigotin, wî xwe bi tirs ve ber bi paş ve date bikişandin û wî date bigotin: Ez nadim bibawerîkirin. Min jêre date bigotin, çima tu nade bibawerîkirin? ku ez Kurdim û ji Kurdistanê hatime. Wî got: Kurdisatan bi cihê Hovberan ve û Kurd bi Hove ve, bi Merkuj ve, bi Diz ve, bi Kelş ve û bi Rêbir ve têtin biderkevtin. Reng û rûwê te bi Merovekî bajarî ve tête biderkvetin û ew pesnên hanê bi te ve nayêtin biderkevtin. Min jê re date bigotin: ku ez Kurdim û ji xelkên Kurdistanê ve têtin biderkevtin. Ew nav û nîşanên te gotî bi carekê ve ji bal Dujminên me de li Ewropa de li ser Kurd û Kurdistanê de hatine bibelavkirin. Min kir û nekir, ku ez vî Ciwanmêrê hanê bidim birazîkirin, ew nehate birazîkirin û ew her û her li ser wê bîr û bawerîya xwe de hate bimayîn.

Birazî! Xelkê wetov li Ewropa de di dema me de li ser Kurd û Kurdistanê de didatin biaxivtin û wetov jî didatin bibawerîkirin. Ev peyvên te ji min re datîn bigotin, bi gewretirîn hêvî û mizgînî ve li ser Kurd û Kurdistanê de têtin biderkevtin, ku belê Kurd û Kurdistanê cihekî rêzdar û hêja ji xwe re di nava cîhana bajartîyê de dane biwergirtin. Ev jî bi xwe jî ve di encamê dawî de bi mujdeya serxwebûna Kurdistanê ve tête biderkevtin. Magelo ji bona Pîrekî mîna min ji vê mujdeyê xweştir û ji vê mizgîyînê bi hêjatir ve di jînê de tête biderkevtin? Belê ez pîr bûme, belam hêvîya bi serkevtina welatê min û serxwebûna wêna ve bi buhatirîn hêjabûn ve ji min re di vê jînê de tête biderkevtin. Heger ku ez rojekê çavên xwe bidim bigirtin, dê ezê bidim bibawerîkirin; ku dê Kurdistan di Rojhilata Navînî de bi serxwebûna xwe ve bi dewleteke milîyî azad ve bête

bitacûxelatkirin.
Birazî! jiber vê hêvîya xweşî gewre ve min date bigirîkirin. Ez te pir li ser wan gotinên te de û jêhatîyên Komele we de li Ewropa de ji bona doza Kurd û serxwebûna Kurdistanê bi nasîna Kurd û
84Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Kurdistanê ve bi miletên Ewropî ve didim bisipaskirin. Hûn Xortên li Ewropa de bi Peyamberên welatê me ve têtin biderkevtin. Ez ji dil û can tevaya xebata we ji bona Kurd û Kurdistanê di nava miletên Ewropî de didim bipîrozkirin. Wî careke din ez hembêzkirin û macîkirim. Hûn bi serkevtî bin. Me xatir ji hev bi vî rengê hanê vedate bixwestin.
Min careke din nema ew date bidîtin, ji ber ku ew hate bimirin. Dibe, ku ev Ciwanmêr yanjî yê din bide bigotin, te çima weha bi dirêj vê ev dîtîna xwe û gotinên Qedrî Cemîl Paşa weha bi dirêjî ve li vê derê de datin bigotin? Ez dixwazim li vir de ji bona Xwendevanên xweyî hêja û pir bi rêz ve rastîyeke pir tirş û tal bidim biderxistin; jiber gava ku em ji bona xwendinê li zanistgehên Ewropa de hatin bihatin, tevaya wan gotinên tirş û talî gotî de ji bal Qedrî Cemîl Paşa de her û her ji me jî re dihatin bigotin. Wetov milet û welatê me li Ewropa de tanî destpêka salên Pêncîyî vî sedsale me de dihatin binaskirin. 65 melyon Xwendevanên Elamnî di rêya xwendina nivîsta Karl May de: "Di nava Kurdistana Hov de" Kurd dane binaskirin û her wehajî ji Kurdan didatin bihezkirin; jiber Nivîsvan bi başî ve li ser Kurd de dabû binivîsandin û wî ev nivîsta xwe di nava zindanê de li ser Kurdan de dabû binivîsandin û wî navnîşana wê ji Mulerê Ingilizî dabû biwergirtin, yê ku wî berî wî nivista xwe li jêr wê navnîşana hanê de dabû binivîsandin.
Gelo ji vê bedbextîyê ji bona miletekî û welatekî bêtir mestir û

girantir tête biderkevtin? Hîç gûman têde nayête biderkevtin, ku ev bedbextîya hanê ji bona meletekî û welatekî jê mezintir tu tiştekî din nayête biderkevtin. Lêbelê bi saya serê xebata Barzanî û şûreşa wî ve û bi saya serê xebata Partîya Demokratî Kurdistana Iraqê ve û bi saya piştigirtina hemû Welatperwerên Krdistanê ji her çar perçên Kurdistanê de em bi vê roja hanê ve bi roja serbilindiya Kurd û Kurdistanê ve ne bes tenê li Ewropa de, lêbelêjî di seranserî dunyayê de pê hatin bigihandin û Miletê Kurd û Kurdistan ji bal tevaya bîr û bawerîya cîhana bajartî de pir bi çavakî rêz û hêja ve lê tête bitemaşekirin û pişta xebate gelê Kurd di seranserî Kurdistanê ji bona rizgarîkirina wîna ji bin hoverîya dagirkirina Rom, Ereb û Ecem tête bigirtin. Li ser van rûpêlên mêjûyî de di xebata me de ji bona serxwebûna kurdistanê û pêkanîna dewleteke milî de divê hemû nifşên

hatî rêbazê Barzanî de di vî warê hanê de bêtin biagehdarîkirin, da ku ew bêtir û betir deha bi baştir ve ji vî karê hanê û rêbazê hanê ve bi serpêhatîtir ve ji xwe re bidin bisûdgirtin, da ku ew biserkevtinê bi kêmtirîn gorî û kurtirîn dem ve bidin bigirawkirin. Karên wetov li ser her nifşekî de di mêjûwê de ji bona çarekirina pirsên dema xwe tête biderkevtin; jiber ku bextiyarî û xweşbûna jîna her miletekî di vê dunyayê de û hêjîbêtir di seranserî mêjûwê de li ser havilên kar û barên nifşên çûyî de ne kêm û nejî bêtir têtin biderkevtin. Bes û bi teha ve jibervêjî ve weha li vê derê de bi dirêjî ve li ser vê serpêhatîya hanê de ez hatim biaxivtin û min li ser de date binivîsandin.

Ev siyaseta hanêyî hovîtî bi beramberî Kurdên Kurdistana Surî ve piçekî nobûna wêna di pêrabûna Hafiz Esed Wezîrê Liberxwdanê de di 13. 11. 1970 de bi wergêrkirina serdarîya Surî ve û bi girtina Gewreyên Basiyên bi ser Efleqî ve hate bidakevtin. Ev pêla hanê di

mêjûwa Surî de di bin nav û nîşana Tevgera Rastkirinê de li jêr Hafiz Esed de ji sala 1970 de tête biderkevtin. Bele ji wê rojê de bayê nobûna şovînîtîyê bi gelekî ve beramberî bi Kurdan ve hate bidakevtin; tevlivêjî ve Kurd di Kurdistana Surî de ji biçuktirîn mafeyên xweyî milî de di warê siyasî, civakî û zanyarî de bi bê pişk û par ve têtin biderkevtin. Daxwazên Kurdan ji serdarîya Surî de bes û bi tenha ve bi şêweyekî demokrasî ve di dana mafeyên wanî siyasî, civakî û zanyarî de tête biderkevtin. Siyaseta hemû partîyan Kurdan di Kurdistana Surî de pir bi nerm û li serxwe de tête biderkevtin. Ew di nava çarçopê demokratîkirina civaka Surî de didin bixebatkirin û di wir jî de çarekirina pirsa Kurd di Kurdistana Surî de didin bidîtin. Hemû pêrabûnên rehperestîyên faşîyên Ef1eqî beramberî Kurdan di Kurdistana Surî de çi di bicîhanîna Amara ji rêdervetî ve yanjî di kembera Erebî de yanî di şêweyê erebkirina Kurdan de nehatin biserkevtin û pirsa Kurd li gel Pirsa kurd de di Kurdistana Iraqê de çarekirina wêna bi şêweyekî demokrasî ve ji bal miletê Ereb de tête bixwestin, heger ku ew bi rast û durust ve li ser serpêhatîyên xwe de û li ser serpêhatîyên miletên din de ji bona çarekirina pirsa milî di çarenûsa miletan de bête biliberkevtin û ew xwe û welatê xwe ji destanên giran û mezin bixwaze bide biparastin, jiber ku neçarekirina pirsa Kurd bi şêweyekî demokrasî ve him li Kurdistana iraqê de û himjî li Kurdistana Surî de bi bomba demê ve li bin lingên wan de û bi 86Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
dijî qazanc û berjewendîyên wan ve dê bi neçarî ve û bi hinera qanûnên jînê ve bête biderkevtin.

87

Raperîna Ciwanrû li Kurdistana Iranê de

Di sala 1957 de piştî pêkhatina komela me bi salekê ve raperîneke

Kurd li Kurdistana Îranê de di bin nav û nîşana raperîna Ciwanrû de li jêr Rêberiya Mohamed Ciwanrû de hate bidestpêkirin". Lêbelê rêjima Şahînşah bi balafiran ve bi gule, top û tankan ve date bi xwestin, ku ew vê raperîna hanê bide bibêdengkirin û wê bide biwêrankirin. Lê tevlivêjî de Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de ev zor û sitema Şahînşahî li seranserî cîhanê de date bitazîkirin, ku belê

24Weke bi bîra min ve tête bikevtin, min Rêberê vê şûreşa hanê di sala 1983 de li

gundê Rajan de date bidîtİn. Wî serdana Mesud Barzanî didate bikirin. Wî bi dil û

can ve di tevaya şûreşa Ilûnê de pişta wê didate bigirtin û Birazyê wî Ferîdon

Cuwanrû tanî nehajî yekek ji Qehremanên Serdarên Pêşmergên Kurdistanê ve tête

biderkevtin, yê ku ew di piranîya şerên man û neman Kurdistanê de hatîye

bibeşdarîkirin. Ew bi nimûneya Pêşmergetîyê ve di her warekî de tête biderkevtin.

Min herwehajî Ferîdon ligel Mamê wî de date binaskirin.

Mesud Barzanî û herwehajî Idrîz Barzanî pir rêz lê didatin bigirtin û mêvandarîyeke bi taybetî ve di dema mêvandariya wî de lê didatin bigirtin. Ew pîrê

hanê pir bi dilxweş ve dihate biderkevtin, gava ku çavên wî bi Pêşmergên Kurdistanê ve dihate bikevtin. Tevî li pîrbûna wîna de û herwehajî nexweşîya wîyî

malwêran de hêvîya serxwebûna Kurdistanê her û her mûyekî ji nava wî serê wîyî

boz ve nedihate biderkevtin. Ew pir bi dilxweşî ve careke din ji nik Mesud û Idriş
Barzanî de ji bona nava Cuwan rû hate bivegerandin.
Min ji xwe re li vî Qehremanê Cuwanrû de tevaya biserhatiyên tirş û talîyên miletê xwe di mêjûwa wî de didate biditin, yê ku wî di dirêjîya rnêjûwê de
her û her heyam bi heyam ve, dewran bi dewran ve, pêl bi pêl ve li ber hebûna xwe
de bi beramberî Dagîrkerên Kurdistanê ve dida bidan û yê ku ew bi saya çiya û
Pîrekên xwe ve di seranserî mêjûwê xwe de hatîye biparastin; jiber ku çiyanên meyî
sext û dijwar her û her em ji hêrîşên û jêrdarîyên Bêganan dane birizgarîkirin û bi
saya serên Pîrekên me ve Zarokên Kurd her û her li ser fêrbûna zimanê meyî perest
de dihatin bişîrvekirin. Bi vî rengê hanê ve zimanê me hate biparastin û pêrejî miletê
me di hebûna xwe jî de hate biprastin.
Miletê Misrîyî xwedan bêtir ji çar hezar salî bajartîyê û şehristanîyê di bilindbûna bajartî û şehristanîya Merovanyê de bi saya ebced hewz ve bigir hate
binemankirin û yên mayî jê neha ew di nava welatê xweyî kevnar de bigir bi nala
Bêganan ve û bi kêm mafe ve têtin biderkevtin.
88Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Kevneperestên Xwînxwarên Serdarên Bêganên Iranî dixwazin, ku ew vî miletê hanê bidin biwêrankirin û wî bi carekê ve ji mafeyên wîyî

milî û merovanîyê de bidin bibêpişkirin.
Cara pêşî bû, ku komela me ev xebata miletê Kurd bi geş ve ji bona tevaya bîr û bawerîya cîhanê ve date bixuyanîkirin, di dema ku hêjî miletê Kurd li Ewropa de nedihate binaskirin. Piranîya pir ji Xelkên Ewropa hêjî nizanîbûn, bê kanî Kurd kîne û ew ji kû ne, ji çi welatî ne û ji çi miletî ne. Her û her li ser destên berdevkên Kevneperestên Xwînrijên û Xwîmijên Turk, Ereb û Farisan de li ser Kurd de hatibû -oinivîsandin û bibelavkirin, yanjî ew name, nivîst û gotarên tirş û tal ji bal Cîhangerên Ewropî de li ser Kurd de hatibûn binivîsandin, yên ku wan bi dûr ve yanjî bi nêzîk ve li ser miletê Kurd de bi bed ve dabûn binivîsandin. Wan ew geh bi dirbûn ve, gehjî bi keleşî ve, gehjî bi vî navî ve yanjî bi navekî dinî bedtir ve didatin binavkirin, da ku ew her û her Serdarên xwe li Ewropa de û Hevalbendên xweyî Kevneperest ji Serdarên Bêganên ji Turkan, Ereban û Farisan bidin bidilxweşkirin.
89
Şûreşa 14 tîrmeha Sala 1958
Hatina Ebdul-Kerîm Qasim ji bona ser Desthilatîyê
Di sala 1958 de di 14 tîrmehê de şûreşeke mezinî demokrasî, pêşverû û welatperwer li Îraqê de hate bivêkevtin. Tevaya sustêma kolonyalizmê li Iraqê de ji rehên wê de hate bilerizandin. Kevneperest û Hevalbendên Impiryalizmê hatin birûxandin. Patîsahî hate bikevtin, ya ku ew bi saya impiryalizma Ingilizî ve hatibû bidurustkirin. Komara Iraqîyî şûreşgêrî hate bipêkhatin. Di vê dema hanê de miletê Kurd, herwehajî miletê Ereb û hêzen pêşverû û demokrasî di Rojhilata Navînî de û pêrejî di seranserî cîhanê de bi vêkevtina vê şûreşa pîroz ve dihatin bidilşad û bibextiyarkirin.
Rêberê şûreşê Abdul-Kerîm Qasim di destûra katîyî komarê de

date bidazanîn, ku Ereb û Kurd di welêt de bihevbeş ve têtin biderkevtin.
Belê Barzanî di meha cotana sala 1945 de ji bona Kurdistanê Iranê hatin biderbasbûn, ya ku têde komara Mehabadê di 22. 1. 1946 de li gorepana çarçiran de li bajarê Mehabadê de ji bal Qazî Mohamed hate bidazîn û ya ku Paytextê wê Mehabad di 15. 12. 1946 de ji bal sipahê Iranî de hate bivekirin û Serokê Komarê Qazî Mohamed di 18. 1947 .12de hate bigirtin û ew di gorepana çarçiran de li bajarê Mehabadê de di 31. 3. 1947 hate bidarvekirin. Serdarîya Iranî bi alîkarîya impiryalizma Ingilîzî û Emerîkî ve ev tev de bi ser serên Kurdan ve date bianîn.
Barzanî bi neçarî ve di 17 axlêva sala 1947 de ji bona Sovyêtê hate biçûyîn, ji wêderê de careke din ji bona Iraqê di 6 meha çêrya pêşî de di sala ı958 de hate bivegerandin û miletê Iraqê bi Kurd û Ereb ve bi vegerandina Barzanî û Barzanîyan ve bi mîna Qehremanên Iraqê ve nebes tenê bi Qehremanên Kurdan ve lêbelêjî bi nala Qehremanên Ereban jî ve ji bona wan datin bipêşewazîkirin.
Çend ew roja hanê di mêjûwa Iraqê de xweş bû, çend ew geş bû. Belê herwehajî ew roja hanê di rnêjûwa Kurdistanê jî de pir bi geş, xweş û pîroz ve tête biderkevtin. Birwerîya wê roja mêjûyî di mêjûwa 90Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Kurdistanê de jiber giringbûn û kêra wêna nayête bijibîrakirin.
Vegerandina 500 Hevalên Barzanîyî din di rêya derya re di gemiya gurozya de di 16 meha cotana sala 1959 ji bona bendera Besra hate bigihandin û li wan jî de û herwehajî li Begdadê û Hewlêre de pêşewazîyeke bê nimûne him ji bal miletê Ereb de û himjî ji bal miletê Kurd de dihate bikirin. Ew bi nala Qehremanên miletê Iraqî ve dihatin biderkevtin. Bi hatina Barzanî û Barzanîyan ve şahî, govend, dîlan û

semawend li seranserî Kurdistanê de dihate bikirin; jiber ku Qehremanên wanî azadîyê, hêvîya jîn û evînî, Pêşmergên Komara Mehabadê, Pehlewanên Barzan bi ser bilindî ve careke din ji bona nava cerg û hinavê Kurdistanê de hatin bivegerandin. Çend Kurd bi vê hatina bi kêr û pîroz ve di seranserî Kurdistanê de dihatin bidilşad û bextiyarkirin, weha deha Dagirkerên Kurdistanê ji tirsa şapê şiyarbûna azdî û serxwebûna Kurdistanê dihatin bilerizandin; jiber ku wan baş didate bizanîn, Barzanî hêvî û durujmê xebata Kurd ji bona rizgarîkirina Kurd û serxwebûna Kurdistanê dihate biderkevtin û hêjîbêtir pêwendîyên wîyî pir xurt ligel dewleta Sovyêtê dê pişgirtineke pir mezin ji bona xebata rizgarîkirina Kurdistanê de di nava Rojhilata Navînî de û di tevaya dunyayê de bide bidurustkirin. Çawan Komara Mehabadêyî nuhhatî metirsî li ser Dagirkirin û kolekirina wan de ji bona tevaya Kurdistanê didate bipeydakirin, weha deha bêtir hatina Barzanî û Barzanîyan careke din ji bona nava Iraqê û kurdistanê û bi pişgirtina xurtî Sovyêtî ve metirsîyeke bêtir li ser kolekirin û bendekirinê de li Kurdistanê de dihate biderkevtin; jiber ku di vê dema hanê de tevgera azadîxwaz li seranserî dunyayê de roj bi roj ve bêtir dihate bigeşkirin û sustêma impiryalizmê, kolonyalîzmê û zordarîyê roj bi roj ve dihatin bilawazîkirin û ber bi rûxandinê ve dihatin biçûyîn.

Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de ev bûyîna mezin di mêjûwa Iraqê de, ev bûyîna mezin di mêjûwa Kurd û Ereb de bi pîrozî ve, bi şabaşî ve, bi dildarî û evîndarî ve, bi tevaya hêz û hinerên xweyî biçûk jî ve pişta şureşa Piroz didate bigirtin. Wê tevaya hêz û hinera xweyî biçûk ji bona liberxwedana vê şûreşa hanê bi beramberî kevneperestîyê ve û herweha jî pêrejî bi beramberî hêzên Impiryalîyê jî ve date bitirxankirin. Wê tevaya hêza xwe ji bona parastîria vê şûreşa

hanêyî pîroz bi serhev de date bikornkirin û wê ew li ber destên
91
Rêberîya şûreşê de date bidanîn. Vê şûreşa mezin dergehê hêvîyeke gewre û giran li ber miletê Iraqê de û herwehajî pêrejî li ber hemû miletê Kurd de li seranserî Kurdistanê de date bivekirin. Bextiyarî, dilşadî û hêvî li Iraqê de di nava milet de roj bi roj ve dihatin bigeşkirin.
Komela me jî bi nala Pasevanekî biçûk ve ji bona danîna rêyekê ji bona Xwendevanên Kurd li Ewropa de dihate biderkevtin û herwehajî wê ji bona piştgirtina vê şûreşa hanêyî pîroz durujmê dostanîyê di nava miletê Kurd û Ereb de didate biberz û bibalakirin û wê durujmê demokrasîyê li Iraqê de ji bona Kurd û çarekirina pirsa wîna didate bixuyanîkirin, ku ev durujmê demokratîkirina Iarqê bi qazanc û berjewendiya Kurd û Ereb ve tête biderkevtin û bes û bi tenha ve li ser bingehê demokrasîyê de pirsa Kurd li Kurdistanê Iraqê de bi aşîtî ve dikare bête biçarekirin. Her û her Komelê didate bixuyanîkirin, ku bes û bi tenha xwe ve li Iarqeke demokrasî de miletê Kurd dikare bi armancên xweyî mîlîyî rewa ve bête bigihandin.
Komela Xwendevanê Kurd Wênerên xwe ji bona Iraqê dane bişandin û wê tevaya dilsozîya xwe û piştgirtina xwe di demên teng û tar de ji bona Şureşa Tîrmehê date bixuyanîkirin.
Lêbelê ev şûreşa hanê, ya ku wê weha bi hêvî û xweş bûn ve pê date bidestpêkirin û ya ku tevaya miletê Kurd û herwehajî hêzên pêşverû li seranserî Rojhilata Navînî de pê dihatin bixetiyarî û bidilşadîkirin û herwehajî pê dihatin bihêvîkirin, careke din ji bal şovînizm û kevneperestîya Ereb û kevneperestîya Kurd jî de û bi serde jî ve ji bal hêzên paşverû de di Rojhilata Navînî de û nemaze jî ji bal hêzên impiryalîya Ingilizî û Emerîkî de dihate bişerkirin. Ev hêzên

tariyê, ev hêzên Ahrumen bi beramberî şureşa Tirmeha pîroz ve tevan bi hev re şerê wê didatin bikirin.
Di encamê dawî de Rêberê şureşê Abdul-Kerîm Qasim
siyaseta xwe date biguhertin, herwehajî pêrejî wî Dost û Dujmin jî bi hev re dane biguhertin û wî xwe bi dil û can ve ji bona nava şapê hêzên kevneperestî û şôvînîyên rehperestên dijî demokrasîyê û miletê Kurd date biavêtin û wî di nava ava wanî şelû de ji xwe re bi tew tew ve didate bimelekirin. Herwehajî wî ji xwe re didate bixwestin,
ku ew di sedsalê bîstan de, di serdema şiyarbûna miletan de li ser bîr û bawerîyên regezperestîyên Efleqê faşî de Kurdan di lûla Erebî de bide
92Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
bijivatin û bide bierebkirin. Weha Abdul-Kerîm Qasim ji xwe re ji bona ser rêya çûn û nehatê date bidan, ya ku berî wî Mustefa Kemal Paşa Bavê Turkan ji sala 1924 de bi ser ve hate biçûyîn, yê ku ew jî pê rojekê ji rojan tevî hemû derd û kulan jî nehate biserkevtin. Ew hate gorbegorkirin, belam Kurd hate bimayîn.
Miletekî wehayî nala kurd, yê ku ji berî zayînê de bi sê hezar
sal ve navê wî di belgeyên Somerî de hatîye bitomarkirin û yê ku ew bi hezaran sal ve li jêr girantirîn derd û êşan de, li jêr tevaya giranîya evsana bihuşta Ereb de nehatîye bibijavtun û nemankirin, dê çawan ev miletê gernas û mêrxas, Pehlewanên Rojhilat li ser destên şovînîya faşîya çepelên Ef1eqî wisa bi bê dengî ve û bi hêsanî ve bête bibijavtin û nemankirin. Vî miletê ku bi hezaran sal ve mayîn, hebûna xwe û welatê xweyî Kurdistanê her û her dabû biparastin û wî her û her welatê xwe bi goristanege tengî tarî ve ji bona hemû dijminan ve dabû bikirin, ji yên ku wan dabûn bixwestin, ku ew bi ceng û şer ve di nava Kurdistana wî de bêtin biderbasbûn û wê ji xwe re bidin bivegirtin û bidin bicî û biwarkirin, yanjî da ku ew li ser de bêtin bizalkirin.

Kurdistan bi navê cihê Pehlewanên Rojhiolat ve bi nav û bang bû. Lêbelê şovînîya Erebî ji xwe re di xewin û nigaşan de mîna Omer dihate bijîyandin, da ku ew ji xwe re Kurdistana rengînî bide bitalankirin, bide ereb kirin û miletê Kurd di sedsalê bîstan de bide bibendekirin û biqirkirin.

93

Derîyê Duwem

Rudanên siyasî ji vêkevtina Şûreşa Ilulê sala tanî 1961-1970de

Siyaseta Qasim beramberî Kurd û Destpêkirina Şer

Kevneperestî û şovıruya Erebî Abdul-Kerîm Qasim didatin biçavsorkirin, wan ew li ser Kurdan de didatin bigur û biharkirin, tanî ku wî şer di ı ı. Ilola sala 1961 de li Kurdistanê de bi destên xwe ve date bivêxistırı". Şerekî sext û ne rewa di nava welatê me de careke din ji nû ve ji bal serdarîya Iraqê de bi hemû hêzên xweyî çekdarî ve bi dir û hovîtî ve hate bivêxistin. Careke din ji nû ve miletê Kurd bi liberxwedana man û nemana xwe ve hate bineçarîkirin. Careke din Kurdistan bi qada ceng û şer ve ji bal şovînîya serdarîya Iraqê de hate bikirin. Careke di nava welatê me de ter û hişk li ser destên hovberên faşîyên Ereb de hatin bisûtandin.

Komela Xwendevanên kurd li Ewropa de bi tevaya hêz û hinera xwe ve, bi tevaya vîn û evîna xwe ve beramberî vî şerê hovberî ji bal Dagîrkerên Ereb de hate birawestandin. Tevîjî ku hêz û hinerên wê jî pir bi biçûk ve dihatin biderkevtin, wê hemû hêzên xwe ji bona li berxwedana Kurdistana agirpêkevtî de datin bidagirtin. Wê bi vî rengê hanê ve Kurd bigir li hemû welat û bajarên Ewropî de, di cihên ku 25Ji xwe re di vî warê hanê de bi dûr û dirêjî ve li gotara Ismet Şerîf Wanlîyî pir hêja

de û bi nerx ve bi zimanê Ingilîzî ve di bin nav û nişarıa" The war liberation of Iraki
Kurdistan" -Cenga rizgarikirinê li Kurdistana Iraqê de-, di ,,Africa, Latin Amerika,
Asia Revolution, YoI.I, No. 4-5, r. ı ı7 - ı55, Lausanne, SwitzerIand ı963 de bidin
bitemaşekirin.

94Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Kurd dihatin bidîtin, datin birêxistin û ew dihatin bidagirtin û wan ji bona hemû hêzên aşitîxwaz, pêşverû û demokrasî lî ser rewş û zîneta Kurdistanê de agehdarî didatin biderxistin, ku miletê Kurd di Kurdistana Iraqê de di bin rewş û zînetên pir dijwarîyî ceng û şerê man û nemanê de têtin bijîyandin û ew li ber hebûna xwe de, li ber man û nema xwe de didin bidan. Herwehajî wê şev û rojê tevaya bîr û bawerîya cîhanê jî li ser wan rewş û zînetên dijwarîyî Kurdistanê de didatin biagehdarîkirin. Herwehajî wê ji tevaya dunyayê re didate bixuyanîkirin, bê kanî çima şovîrîîya Ereb dide bixwestin, da ku ew vî miletê rebenî belengaz ne bes tenê wîji dewlemendbûna welatê wî bide bibêpişk û bibêparkirin, ne bes tên ew Wîji biçûktirîn mafeyê merovanîyê jî de bipêpişk û bibêparkirin, lêbelê hêjî bi serde jî ve ewdixwaze
vî miletê reben û belangaz bide biqirkirin; da ku ew ji xwe re dewlemendbûna Kurdistanê bes û bi tenha ve ji nefetê ve 90 melyon ton bide bitalankirin û di encamê dawî de Kurdistan bide bierebkirin. Serdariya Erebîyî bêgane Kurdistan didate bitalankirin û miletê Kurd didate bikole û bibendekirin. Wê tevaya siyaseta Afriqya Jêrin di nava Kurdistanê de didate bicî û biwarkirin.
Komela me, cerg û hinavên Kurdan li derve de di vê dema

teskî mêjûya welat û miletê me de cihekî gewreyî giring ji xwe re ji bona şiyarkirina bîr û bawerîya cihanê li ser rewş û zînetên dijwarî Kurdistana agirpêkevtî de date biwergirtin. Di vê dema hanê de jêhatîbûna xebebata Komela me ji bona agehdarîkinê û ragiyandina bîr û bawerîya cîhanê li ser rewş û zînetên Kurdistanê de dihatin bigûrkirin.

weha vê Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de dibustana Kurdewarî di Ewropa de yekemîn daxuyanî li ser vêkevtina şureşa ı1 1101asala 1961 de ji bona bîr û bawerîya cîhanê di 18. 9. 1961 de date bibelavkirin û ev daxuyanîya hanê bi rastî jî ve bi yekemîn daxuyanî ve ji bal Kurd de li se vêkêvtina vê şûreşa milîyî mezin de tête biderkevtin; jibervêjî ve ev daxuyanîya hanê ji bal Komela Xwendevanên Kurd de pir bi mêjûyî ve tête biderkevtin.

Ez li vir de bes û bi tenha ve jê çend pevikan didim bitomarkirin, da ku Xwendevanên hêja dûrbûna rastîya remana vê pevekêrı hanêyî mêjûyî ji xwe re neha lê bidin bitemaşekirin: "Em li ser bingehê hêza miletê xweyî bi yekkirî ve û bi alîkarîya bîr û

bawerîya cîhanî ve bi serkevtinê ve têtin bipiştrastkirin. Serpêhatiyên miletan di vê serdema me de û rastîyên mêjûyî bi diyar ve didin bidubarekirin, ku hîç hêzek di vê cîhanê de nikare pêgîrîya miletê me ji bona xabatê li pênavê azadîyê de bide binabûdkirin,"

Weha vê Komela Welatperest bi tavaya karîna xwe' ve ji roja vêkevtina şureşa nola mezin bi dilsozî ve, bi jîrbûn û jîhatî ve û li ser bingehekî siyasîyî zanistîyî pir bilind ji bona gihandina dengê wê û miletê me ji bona bîr û bawerîya cîhanê ve didate bixebatkirin.

Wehajî jibervêjî ve dehajî şovînî û faşîya Ereb di bin pir nav û nîşanan de hîrêşên mezin ji bona ser komela me didatin bianîn û çi

navên bed jî di ferhenga Erebîyî faşî de bi dû komela meyî xweşevist ve didatin bixistin.
Hinan ji wan xwe bi nav ve bi sosyalistî ve didatin bidanîn, belam di rastî de bi şovînê dihatin biderkevtin. Wan dev ji bona komela me didatin biavêtin; jiber ku bes û bi tenha ve vê komelê bi dilsozî ve li ber xebata gelê Kurd de li jêr man û nemanê de ji bal faşîya Ereb de didate bidan û dengê wî, derdên wî bi bîr û bawerîya cîhana bajarî ve li ser hovîtîya serdarîya Dagîrkerên di nava Kurdistanê de didate bigihandin. Herwehajî wê rep û rast di seranserî Ewropa de şovînizma regezpersta Ereb bi karên wêyî wêrankirin, kuştin û talnkirina milet û welatê me ve didate birût û biqutkirin û ew li ber çavên tevaya hêzên aşîtîxwaz, pêşverû û demokrat de didatin bitazîkirin. Belê Dagîrkirina Ereb ji bona nava Kurdistanê bi vegirtina Cengîzxan ve di dunyayê de dihate biberamberkirin û ew careke din di hovberîya xwe de ne bi kêmî vegirtina Kurdistanê ve di pêla Omer Kurê Xetab de der sala 640 z. de dihate biderkevtin". Wan careke din
26Ji xwe re di vî warê hanê de li nivista Ekrem Cemîl Paşa bi zimanê Kurdî ve:
Dîroka Kurdistan, r. 122 - 166 bidin biternaşekirin. Cihê vê nivîstê û sala derkevtina
wêna li ser de nehatiye binivîsandin; lêbelê wertête biderkevtin, ku ew li baja
Bêrûdê de hatîye biçapkirin. Ev nivista hanê pir bi nerxe ve li ser dagirin û
hovberîya Ereb de di pêla Mosulmarıtîyê de di nava Kurdisanê de bi belge ve dide
binivîsandin, ku Merov jê neha hovîtîya Basîyan him di Kurdistana Iraqê de û himjî

di Kurdistana Surî de beramber Kurd de bêtir dikare bête biliberkevtin. Di her kat û
zemanekî de Talanker bi Talanker ve û bi Hovber ve tête biderkevtin. Mûyekî
Rehperestên Ereb ne di wê çaxê de û nejî di neha de di bin her çi navekî jî de dev ji
hovberîya xwe nedane biberdan,
96Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
ji nû ve kela xwe bi wêrankirina Kurdistanê û kuştina giştî ve didane bisarkirin.
Komela me tevî li van devavêtinên van Berdevkên Rehperestên
Erb de her û her ew bi zanebûn û konetî ve li ser karên û erkên xweyî milî û welatî de di tevaya welatên Ewropî de dihate biçûn.Wê her û her pêwendîyên xwe ligel hêzên pêşverû, azadîxwaz û demokrat de di seranserî cîhanê de didate bixurtkirin û bi taybetî ve wê pêwendîyên xwe ligel Xwendevanên Yekkirtîya Cîhanî de didate bixurtkirin.
Hêzên bi nav sosyalistî û pêşverûyên Ereb ve pir kosp û kelem li ber kevtina Komela me de ji bona nava sazmendîya Xwendevanên Yekkirtîya Cîhanî de pir bi erzanî ve didatin bidanîn, da ku em bi Endamê wê sazmendîya Xwendevanên cîhanê ve neyêtin bikirin û da ku em dengê miletê xwe Kurd li seranserî Kurdistanê de bi genc û xortên, Keç û lawên cîhanê ve nedin bigihandin, da ku bêtir û bêtir Kurdistan li jêr lep û pencên Dagirkerên Rom, Erem û Ecem de di nava xwîna xwe de bête bivegevizandin. Tev li van kevtileftên Faşiyên Dagirkerên Kurdistanê jî de bi dijî komela me ve di sala 1964 de komela me bi Endam ve di sazmendîya Xwendevanên Yekkirtîya Cîhanî de hate biwergirtin. Ev rojeke xweş bû, belê ev di mêjûwa komela me de rojeke geş bû; jiber ku vê komela hanêyî pêşverû û

welatperwer ji sala 1956 de ji bona vê endametîya hanê didate bikeftiletkirin û bixebatkirin.
Belê di encamê dawî de ev xebata hanê bi endambûna komela me ve di nava Xwendevanên Yekkirtîya Cîhanê de di piştî demeke dirêj û têkoşîneke li ser xwe de û bi bînfirehbûn ve bi beramberî Berdevkên Dagîrkerên Kurdistanê de hate bitac û bixelatkirin. Xebata Xwendevanên Kurd li Ewropa de bi ser hêzên şovînîyên Dagîkerên Kurdistanê ve hate biserkevtin; tevî ku ew jî bi hemû xurtbûn û karinên xwe ve her û her bi dijî Endametîya Komela me ve dihatin birawestandin. Belê xebata Komela me di vî warê giringî hanê de ji bona gihandina dengê Miletê Kurd û şûreşa wîyî pîroz ji bona tevaya keç û xortên Dunyayê li ser wan hêzên tarîyê de hate biserkevtin. Çurûşkeke bi hêvîyî bêtir ve û bi baştir ve ji bona gihandina dengê Kurd û zinet û rewşên Kurdistanê ji bona bîr û

bawerîya tevaya cîhanê dihate biderkevtin, ya ku wê cerg û hinav li Dagîrkerên Kurdistanê de didate bisûtandin û hîmê serdarîkirin û tal kirina wan him ji bona mafeyê Kurd û himjî ji bona dewlemendbûna Kurdistanê didate bihejandin; jiber ku miletê Kurd di tevaya mêjûwa xweyî dirêj de di bin destên hovberên Serdarên Rom, Ereb û Ecem de bi bê xwedî ve, bê kes û kûs ve dihate biderkevtin û ev jî bes û bi tenha ve jiber ku em him nezanbûn û himjî me nikarîbû bi zanebûn û jîrbûn ve dengê xwe bi seranserî meletên çihanê ve bidin bigihandin. Bedbextîya me her û her di nezanîya me de dihate biderkevtin û nezanîya me jî her û her di bedbextîya me de dihate biderkevtin. Komela me bi vê endambûna xwe ve di nava Yekkirtîya Xwendevanên Cîhanî de dikarîbû piçekî vî bazinê bi tenhakirina hanê ve ji bal Dujminên me de ji bona me bide bişikenandin. Belê

şikenandina vê xeleka bi tenhakirina Kurdan ve di cîhanê de ji bal Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de bi gaveke pir bicûk ve li ser rêya pêşkevtina xebata wî ji bona rizgarîkirina wî û welatî wî ji bin jêrdarîya hovî Serdarên Rom, Ereb û Ecem ve dihate biderkevtin.
Hêvîya azadîyê û serxwebûna Kurdistanê di nava cerg û hinavên miletê me de dihate bigeş û bigûrkirin; jiber ku her û her Dagîrkerên Kurdistanê ji Rom, Ereb û Ecem ji bona bi tenhakirina Kurdan di vê dunyayê de pir bi xurtî ve û pir jîrbûn ve didane bixebatkirin, da ku ew her û her bi bê dengî ve Kurdan di nava Kurdistanê de û di nava xwîna wan de bide bivegevizandin û dewlemendbûna Kurdistanê ji xwe re bi bê dilovanî ve, belê bi hovberî ve bidin bitalankirin. Bedbextîya bi tenhabûna me di vê dunyayê de hemû bi carekê ve bes û bi tenha ve di nezanîya me de dihate biderkevtin. Herwehajî pêrejî bê xwedî û xwedanîya me, bê kes û kûsîya me û bê bextîya feleka me tevde bi carekê ve rehên wan di nava nezanîya me de dihatin bicî û biwarkirin. Nezanîya me bedbextîya me bû, bedbextîya me nezanîya me bû. Gava ku piçekî miletê me jî di seranserî Kurdistanê de hate bizanebûn, hêdî hêdî jêre jî mîna hemû miletên vê dunyayê dergehê jîn û jîyanê, dergehê rizgarîkirirıê, azadîyê û serxwebûnê dihate bivekirin û lerza taya mirinê bi Hovberên Serdarên Dagîkerêrı Kurdistanê ve ji Rom, Ereb û Ecem dihate bikevtin.
Wetov Kurd vê carê bi baştir ve pêwendiyên xwe ligel derve de bidin bikirin, da ku ew bêtir dengên xwe bi seranserî dunyayê, miletan
98Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Û dewletan re di rêya rêxistinên xwe re bidin bikirin û herwehajî ligel Rojnemevan jî bidin bikirin, mîna ku ev hevpeyvîna Barzanî ligel Peyamberê rojnama New York Times de li cihekî de di Kurdistana rizgarîkirî de ji bal serdarîkirina Diktator Ebdul Kerîm Qasim de hate

bikirin û ev pirsên hanê ji Barzanî hatin bikirin, yên ku ew di rojnama Xebat de di jimara 468 de di çirya pêşî de di sala 1962 de hatîye bibelavkirin û jiber giringbûna wan ji alîyekî de û ji ber cihê wanî mêjûyî ji alîyê din de ez van pirsên hanê li vê derê de didim biwergerandin û bitomarkirin:

Pirs: Armancên we di vê şûreşa hanê de bi çi ve têtin biderkevtin?

Bersîv: Ji miletê Kurd re hate biderkevtin, piştî ku ew di jimarekê de ji salan de ligel Qasim û ne Qasim de hate bijîyandin û wî ji xwe re date bidîtin, ku jîyaneke wetov mîna berê û bi şêweyê berê ve nikare ne bête biliserçûyîn û hêjîbêtir ew nikare bi wî corî ve pê bête bijîyandin; jibervêjî ve ew ji bona daxwaza ewtonomî di nava tara dewleta Iraqî de hate bineçarîkirin, da ku ew ji xwe re hinekî ji azadîyê û aramîyê bide bigirawkirin. Herwehajî jiber ku ez bi neferekî ve ji neferên vî miletê hanê ve têtim biderkevtin û herwehajî jiber ku ev daxwaza hanê ji nava nîvî vîna miletê Kurd de bi carekê ve tête biderkevtin, ez jî pişta vê daxwaza hanê didim bigirtin û ez ji bona wê didin bibangkirin, da ku ew bête bicihanîn. Me tu carî bi carekê ve ji bona pêkanîna serdarîyeke Kurdistanîyî serbixwe ve nedaye bidaxwazîkirin.

Pirs: Bi çi ve rola te di vê şûreşa hanê de tête biderkevtin?

Bersîv: Ez dixwazim tevde bidin bizanîn, ku ez ne bi Serok ve, nejî bi Serdar ve û nejî bi Rêber ve têtim biderkevtin. Ez bes û bi tenha ve bi neferekî ve ji vî miletê hanê ve têtim biderkevtin. Ez xwe bi biçûktirîn nefer têde didim bidîtin. Hîç tu daxwazên min nayêtin bidîtin, jibil ku ez ji bona vî miletê bê pişk û par bidim bixebatkirin, yê ku Qasim bi hêz û hinerên xwe ve dide bixwestin, ku ew wî bide biqirkirin. Tiştên ku tanî neha hatine bicîhatin, ew ne ji bona saya serê min têtin bivegerandin; lêbelê ew ji bona saya karê vî miletê qehreman û

pehlewan ve têtin bivegerandin, yê ku ew nayête bibezandin. Milet vî karê hanê ji xwe re dide bikirin.
Pirs: Magelo tu bi Rojhilat ve yanjî bi Rojava ve tête bibestandin?
Bersîv: Pir bi başî ve ji xwe re bidin bizanîn, ez bi Merovekî bê layîn ve têtim biderkevtin. Pêwendîyên me ne ligel Rojhilat de û nejî ligel Rojava de têtin biderkevtin. Navbidûxistina me ji bal Qasim de, ku em bi Impiryalîya Ingilstanê ve têtin bibestandin, bes û bi tenha ve bi derewekê ve tête biderkevtin, ku Qasim bi xwe jî ve vê dide bizanîn. Lêbelê ew bi vê navdûxistina hanê ve bi dû me ve ji xwe re dide bimebestkirin, da ku ew Ereban û Kurdan bi dijî me ve bide bilivandin û herwehajî da ku ew ji xwe re mehnan bide biafirandin, da ku ew hêrîşêrı xweyî hovberî ji bona ser me bide birakişandin. Hîç gûman têde nayête biderkevtin, di vê pêla ku hûn di nava me de didin birabuhurandin û hûn li ser zînetên me de têtin biagehdarîkirin, ji we re bi eşkere ve hate biderkevtin, ku em bi bê layîn ve him ji Rojhilat û himjî ji Rojava ve têtin biderkevtin.
Barzanî hevpevîna xwe bi vê gotina xwe ve date bidawîkirin,
ku wî date bigotin:
"Di vir de ez dixwazim vê kêsa hanê ji xwe re bidim biwergirtin, ku ez peyvekê ji bona birayên xweyî Ereb li Iraqê de bidim birûkirin û ez ji wan re didim bigotin, ku em ne bi dujminên wan ve têtin biderkevtin û şûreşa me ne bi dijî wan ve tête biberkirin; lêbelê ew bi dijî dujmirıê meyî hevbeş Ebdul-Kerîm Qasim ve tête biberkirin. Daxwazên xwestîyên me ew bi Iraqîyî giştî ve têtin biderkevtin. Ew bi bêtir ve bi berjewendîya Ereb ve ji berjewendîya Kurd de tête biderkevtin. Em bi şûreşê ve nehatine birabûn; lêbele Ebdul-Kerîm Qasim ew li ser me de bi lêzordarîkirina miletê Kurd ve û bi hewildana qirkirina wîna ji hebûnê ve date bineçarîkirin. Em bi hilgirtina çek ve ji bona li

berxwedana xwe û hebûna xwe de hatin bineçarîkirin. Di dawî de ez didim bihêvîkirin, ku ew ji bal Ebdul-Kerîm Qasim de bi fêlekê ve neyêtin bixapandin, da ku ew bi wan ve pê bidin bikarkirin û ew wan bide biserbazîkirin û wan ji bona dijî me bide biajotin. Em ji wan didin bixwestin, ku ew mil bi mil ve ligel me de bidin bixebatkirin, da ı00 Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
ku em bi hev re serdarîkirina vî Diktatorê Zordar û Bedkarê yekem ji bona civata Iraqê bidin bihilanîn. Silav ji bona we tevan.":"
Gava ku Merov ji xwe re li van bersivên hanêyî Barzanî de bi hûr û kûrî ve lê dide bitemaşekirin, Merov tevaya dildarî, dilsozî û hêjîbêtir kûrbûn û dûrbûna dîtina vî Hozanê Rêberê gewreyî mezin di rnêjûwa xebata Kurdistanê de ji xwe re bi eşkere ve dide bidîtin; jibervêjî ve tevaya Dujminên Kurd kîna xwe li ser Barzanî de didatin bigirêdan, jiber ku cerg û hinavên wan ji sawa vî Hozanê Pirî zeman de di xebata kurdistanê de di dilsozî, jîrbûn û zanebûna wî de dihate bilerizandin û taya tamara mirina dagîrkirina wan di nava Kurdistana perest de bi wan ve hatibû bikevtin û dagîrkirina wan ji bona Kurdistanê bi saya vê dilsozî û zanebûna Barzanî ve bes û bi tenha ve bi pirsa demê ve dihate biderkevtin; jiber ku Barzanî şiyarbûna milî li ser bingehekî rast û xurt de ji bona azadîkirina Kurdistanê, serxwebûna wêna û pêkanîna dewleteke mîliyî serbixwe ve di nava Rojhilata Navînî de date bitac û bixelatkirin. Magelo ji bona vê taya tamara mirina dagirkirina wan de ji bona Kurdistanê de ji rêbazê Barzanî tiştekî din bi tirstir ve ji wan re tête biderkevtin?
Divê Serdarên dagîrkerên Rom, Ereb û Ecem vê pirsa hanê ji xwe re ji Cewahirî Mirê Mîran di Xweşxuwanîyê de bidin bikirin, gava ku wî di Kongirê Heştemî Komela Xwendevanên Kurd de ji 9-
1963 .8 .15de li bajarê Monîx de li Elmanya Federalî de bi

xwexuwanîya xweyî bi nav û deng ve li ser "Kurdistan yanjî Cihê Pehlewanan" de di demjimara 16 de di êvara roja çarema 16. 8. 1963 de date bixwendin, ku ew wetov di malikekê de pê dide bidestpêkirin: Vejandina miletekî bi Mustefa ve bête bidestpêkirin dunya bête bicûn, ew tête bimayîn

27Wer tête biderkevtin, ku ev Rojemevanê hanê bi Schmidt Dana Adams tête biderkevtin, yê ku wî di pişt re nivisteke pir hêja û bi nerx ve bi zimanê Ingilizî ve li jêr navnîşana=Journey among Brave Men, Little Brow & Co. Boston USA ı964 de date binivîsarıdin. Dana Simis di rêya Surî deû bi alîkarîya Ekremê Cemîl paşa ve û bi hevaltiya wî ve ji bona Kurdistana Iraqê pir bi dizî ve hate biderbasbûn û ew bi Rojnemevanîyê giringîyî Biyanîyi pêşî ve tête biderkevtin, yê ku wî pêwendî ligel şureşê de date bikirin û herwehajî raportekî pir giring di rojnama xwe de li ser Kurd de date bibelavikirin.

101

Ev xweşxuwana hanêyî pir dirêj wî di rêya hatina xwe de ji Pirag ji bona Monîx di tirênê de date binivîsandin, ya ku ew bi xweşxuwaneke pir bilind û bi nav û deng ve li ser Kurd de hatîyê binivîsandin, ku têde tevaya têgihiştina Şiyarvanên Ereb li ser pirsa Kurd û pêwistîya piştgirtin û çarekirina wî dide biderxistin. Jibervêjî ve Cewahirî jî bi durujrnê Dostanîya miletê Ereb û Kurd ve tête biderkevtin. Cewahirî wetov pir ji miletê Kurd didate bihizkirin; bes û

bi tenha ve jiber ku wî weha deha ji miletê xweyî Ereb re didate bihizkirin.
Cewahirê ev xewşxuwana xweyî hanê bi dengekî xweşî zelal ve di kongirê de ji me re date bixwendin û kulavekî neqişkirî bi navê Kurdistanê ve li ser serê wî de dihate biderkevtin û ew kulavê hanê ji bal Celat Talebanî ve jêre hatibû bidiyarîkirin û bigir ew hergav li ser serê wî de dihate biderkevtin û wî pir ji wî kulavê xwe didate bihezkirin. Gava ku wî ew xweşxuwana xwe di danê piştnîvro de ji me re date bixwendin, tevaya derd û kulên me di nava wan bêhnên xweş de dihatin bijibîrakirin. Hemû Endam û mêvanên Gongirê pir bi wê xweşxuwana wina ve hatin bidilşadîkirin û hêvîya wan ji bona azadîyê, serbestiyê û serxwebûna Kurdistanê hate biberz û bibalakirin. Herwehajî di vî kongirê hanê jî de Celal Talebanî jî hatibû biamadekirin û wî jî bersîveke pir xweş û bilind li ser vê xweşxuyanîya xweş de date bikirin û bi navê Miletê Kurd ve wî pir sipasî Cewahirî Mîrê Mîrên Xweşxwevanan di cîhana Ereb de date bikirin û ew bi durijmê dostanîya Kurd û Ereb ve date biderxistin. Di piştî gotina Celal Talebanî re bigir piranîya Amdevanan dest bi xwendina Xweşxwevanan û Pexşanan dane bikirin, Tanî ku yekekî ji Amadevanên kongirê date bigotin, ku hola vî Kongirê hanê bi Bazara Ukaz ve êtir tête biderkevtin.

ı02 Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
'Hatina Basîyan ji bona ser Deshilatîyê
Wergêrkirina Basîyan di 8. 2. 1963

Di 8 reşmeha sala 1963 de şovînizma faşîya Ereb rêjîma Abdul-Kerîm Qasim bi wergerîneke sipahî ve date birûxandin û sustêma faşîyî Erebî li Iraqê de date bidanîn; jiber ku ew pir hatibû bilawazîkirin. Abdul-Kerîm Qasim bi du nexweşiyan ve hatibû bikevtin. Yekek jê

nexweşîya meznahîyê bû û ya din bi nexweşîya nezanîya cewhera siyasetê ve dihate biderkevtin. Wî dost û dujminên xwe bi hev re didatin biveguhertin û agir di nava wan de didate bivêxistin, da ku ew xwe ji şerên wan bide bivegirtin û biparastin û wan xwe bi xwe ve bi hevdû ve bide bimijûlkirin û biko kirin.
Ev herdu nexweşîyên hanê di her zemanekî de û li nik her Serdarekî de bi bê derman ve têtin biderkevtin û ew di encamê dawî de serê xwedîyê xwe didin bixwarin û wî ji gorepana siyasetê bi darê zorê ve û bi hinera qanûnên jînê ve didin bipengizandin.
Ji alîyê din de Abdul-Kerîm Qasim ji xwe re nedidate bizanîn, ku ew ji bal hêzên siyasîyî kêrdarên pevçûnkirî de ligel hevdû de li Iraqê de bi bûkeke pepûkîyî pir pufdayî ve ji bona yarikirina pê li gora qazanc û berjewendîyên xwe de ji bona ser textê siyasetê bi neçarî ve hatibû binardin û wan pê ji xwe re li gora dilê xwe de û ji bona qazanc û berjewendîyên xwe didatin biyarîkirin. Wî li valî û li walî de çep û rast bi bê agehdarî ve di jîyana xewin û nigaşan de li ser wî textê hanêyî hejandî de li bin pê de bi xwe ve lotik didatin bidan û wî ji xwe re bes û bi tenha ve didate biqîrkirin û biqîjkirin: Ezim, Serko bi tenha xwe ve, bi tenha xwe ve têtim biderkevtin; belê ew ne bi Serokê bi tenha xwe ve bi rastî ve dihate biderkevtin; lêbelê bi rastî ve ew bi rast û durust ve bi Şêtê zeman ve dihate biderkevtin. Wê çaxê, wê gavê tevaya bedbextîya miletan di mêjûwê de hatîye biderkevtin, gava ku Şêtên wetov bi Serdarên wî veyanjî bi Rêberên Wî ve têtin biderkevtin.
103
Wetov pir bi hêsanî ve ev kesê bê kes û kûs û Şêtê zeman ji ser textê siyasetê de hate biavêtin û bipengizandin û li ser sergoyê mêjûwê de ew hate bidanîn. Ew bi nala Qehremanekî ve ji bona ser textê mêjûwa siyasî de bi saya vêxistina şûreşa ı4 tîrmeha pîroza sala ı958

ve hate biderkevtin, lêbelê ew bi nala pepûkekî ve, bi nala dînekî, hîç û pûçekî ve ji bona ser sergoyê mêjûyê hate bipengizandin û têde û li ser de hate bicî û biwarkirin. Evaya bi dawîya destana nezanîya wî û şêtbûna wî ve bi xwe ve hate biderkevtin.

Vê rêjîma faşîyi hanê di ıo. 6. 1963 de 28jinuh ve ne bes tenê hêrîşeke pir giran û mezin ji bona ser Kurd date birakişandin, lêbelêjî pêrejî wê didate bixwestin, ku ew hemû hêzên demokrat û welatperwerên Erebî jî ji rehan de bide biqirkirin. Wê bêtir ji lA 000 Komonist datin bikuştin û 120 000 Merov dane bigirtin; jiber ku şovînî û faşîya Erebî bi tirina Emerîkî ve ji bona ser destên desthilatîyê hatibûn bigihandin, mîna ku wan wetov ji xwe re didatin bigotin. Wan hêzên Nasirî û miliyîn dinî Erebî jî ji ber xwe de dane birakirin û ew pir bi hovî ve dane biserkutkirin. Di wê çaxê de wan xwe ji bona nemankirina Kurdan dane bivalakirin û bi amadekirin û wan dest bi hêrîşa xweyî dir û hov ve ji bona nemankirina Israila duwem dane bidestpêkirin.

Ji xwe re li vê derê de bi dûr û dirêjî ve li daxuyanîya Partîya Demokratî Kurdistan de di 11. Axlêva 1963 de li jêr vê navnîşana hanê de: "Çeteyên Basiyên Serdar di Iraqê de li ser melitê Kurd de cengeke gemarî didin bidadan". Di vê daxuyanîya hanê de bi dûr û dirêj ve partî tevaya pêwendîyên ligel Basî de ji ıo. 2. 1963 de tanî vêkevtina şer bi dûr û dirêjî ve dide binivîsandîn û herwehajî têde ew tevaya pêrabûnên Basî bi dijî Kurd ve di wê daxuyanîya xwe de dide bitomarkirin û herwehajî ew têde tevaya siyaseta Basî didin biderxistin. Di vê daxuyanîya hanê de bi eşkere ve tête biderkevtin, ku Basîyan bes û bi tenha ve xwe ji bona şer didatin biamadekirin û wan ji xwe re didatin bixwestin, ku ew ji xwe re piçekî ji demê kar bidin

28Cercis Fethulah di nivista xweyî pir hêja û binerx de bi zimanê Erebî ve: Serdanek
ji bona mêja nêzikde, r. 120, Sutokholm sala ı998 de dide bigotin, ku er rast û
durust di 15. 6. 1963 de dayite bidestpêkirin.

104Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
biwergirtin, tanî ku ew xwe bi rêk û pêktir ve ji bona cenga ser Kurdistanê de bidin bikarxistin. Herwehajî têde tête binivîsandin, ku Kurd ji dil û can ve didatin bixwestin, ku ew pirsa xwe bi şêweyekî aşîtî ve bidin biçarekirin; belam Basîyan di pêşîya pêşî de biryara vêxistina cengê li ser Kurd de ji xwe re dabûn biwergirtin û wan bi cengê ve didatin bixwestin, ku ew şureşa kurd û pirsa wî bidin binemankirin û Kurdistanê ji xwe re bidin bierebkirin û Israila Duwem jixwe re bi nimûna nemankirina Israi1a Yekem ve bidin bikirin.

Herweh . i Komela Xwendevanên Kurd careke din di cotana
sala 1963 de daxuyanîyek bi navê komitîya bi rêvebirina giştî ve date biderxistin. Em van dêrên hanê jê didin biwergirtin û didin bitomarkirin: "Şerê vêkevtî di neha de di nava Kurdistanê de ji bona Partîya Basî bi rastî ve û ne ji bona miletê Erebî merd "bi şerê man û nemanê ve" tête biderkevtin, mîna ku ev li ser zimanên Rêberên wêyî Serserî de hatîye biderkevtin. Bes û bi tenha ve çarenûsek çavdêriya partîya Basî dide bikirin, ew jî bes û bi tenha ve di mirîna wêyî mayî de ne bes tenê di Iraqê de lêbelêjî di tevaya cîhanê Erebî de tête biderkevtin."

"Înên tên dê bêtir û bêtir bidin biderxistin, ku Rêberên Bas di pêşbînî û texmînên xwe de hatine bişaşkirin û herwehajî dê çiyayên Kurdistanê pir bi xurtir ve vê û bi deha ve bi sengîntir ve ji hêzên wanî harbûyî û pasevanên wanî faşit ve bêtin biderkevtin."

Ev rastîya hanê careke din ji me re dide bixuyanîkirin û bidubarekirin,ku miletekî azad miletekî din bi bin jêrdestên xwe ve nade bikirin. Wê hêrîşeke mezinî giranî hov û dir bi bê nemûne ve di mêjûwa Iraqê de li ser hemû hêzên demokrat, pêşverû û welatperwerên Ereb de date bidadan. Tevaya Iraqê bi zindaneke mezinî tarî ve ji bona hemû hêzên pêşverû, demokrat û we1atrperwer date bikirin. Kîna tîbûna wêna bi xwîna van Welatperwer û Demokratên Ereb ve nehate bişikenandin; jibervêjî ve careke din şovînizim û faşîya Ereb date bixwestin, ku ew ji nû ve hêrîş eke gewreyî bi dir û hov ve ji bona ser kurdistanê bide birin, da ku ew têde ter û hişk bidin bisûtandin û Israila Duwem ji ser rûwê zemînê bide bihilanîn.

Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de ji bona hemû hêzên pêşverû û demokrat li seranserî cîhanê de date bixuyanîkirin, ku ev

hêzên faşîyên Basîyên Iraqî, zarok û sêweyên Efleq, ev kotî û keçelên mêjûwê, yên ku ew ji bona ser serdarîyê bi tirina Emerîkî ve hatine bihatin, ne bes tenê bi dijî Kurd ve têtin biderkevtin, lêbelê jî ew bi dijî miletê Ereb jî ve têtin biderkevtin. Herwehajî pêrejî ew bi dijî hemû hêzên pêşverû û demokratî ve bi giştî ve di Rojhilata Navînî de têtin biderkevtin û ew di encamên dawî de metirsîyeke mezin û giran li ser aşîtîyê û aramîyê de di Rojhilata Navînî de didin biderxistin.

Herwehajî Partîya Demokrat Kurd li Surî de di rojnama organa xweyî Dengê Kurd de di tîrmeha sala ı963 de di ser gotara xwe de di bin nav û nîşana"Li ser rastîya daxwazên Kurd de di Iraqê de" bi dûr û dirêjî ve li ser siyaseta Basiyên Efleqî de li iraqê de ji bona nemakirina Kurdan li Kurdistana iraqê de dide biaxivtin û herwehajî ew li ser siyaseta Basîyên Efleqî Surî de ji bona yarmetîya Basîyên Iraqê de bi

xwarin û vexwarinê ve, bi çek û teqemenî ve herwehajî bi rêkirina sipahên xwe ve ji bona qirkirina kurdan di nava Kurdistana Iraqê de dide binivîsandin. Herwehajî wan li ser pêrabûnên Basîyên Efleqî de bi dijî Kurdên Surî ve ji girtinên bi komel ve û azardana bi hovîtî ve ji bona xelkên bê guneh ve dane bidestpêkirin, Li Kurdistanê de Siphayê Basîyî faşî dixwestin Kurdan bidin biqirkirin û li Surî de Basîyên hovberên Efleqî dest bi Erebkirina heremên Kurd ve dane destpêkirin."

29Di tûndbûna pêrabûnên Basî de bi girtina bi sedan ve ji Kurdan û gerandina bi hezaran ve di nava mal û xanîyên Kurdan de û azaradan Pîr û Kalan, Pîrek û Zraokan tevaya hovberîya Basiyên faşî dihate biderkevtin. Tirs û saweke pir mezin bi van rabûnên xweyî dir ve Basîyan di nava Kurdan de dane bibelavkirin, yên ku ew bidijî her mafeyekî qanûnî û merova nî ve dihatin biderkevtin. Girtina her qawinekî bi sitiranên Kurdî ve yanjî her pelekî nivîsandî bi zimanê Kurdî ve Xwedîyên wan ji bona bênê zinadanên faşiyên Basî dihatin biavêtirı. Belê Dadgehên Lêgerandinên sedsalên navanî di nava welat û miletê me de li Kurdistana Surî de li ser destên Zarokên Omer de careke din di nava Kurdistana rengîn de hatin bipêkhatin. Wan jî mîna Dadgehên Lêgerandînê di Sedsalên Navînî de û herwehajî

nala Naziyên Elmanî ji sala 1933 de hemû Nivîstên bi bê dilê xwe ve didatin
bisûtandin û Xwedîyên wan ji bona binê zindanan û azardanê de didatin birêkirin.
Mala me ji tirsa Dadgehên lêgerandinên Sedsalên Navînîyî Basîyî faşî de hemû nivîstxana min bi nivîstên Kurdîyî civandî de û pir bi nerx ve ji bona nava
binê tenûrê datin biavetin.
106Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Şerekî ne rewa û dir û hov bi bê nimûne ve tanî wê demê li Kurdistanê de hate bidestpêkirin. Basîyên faşî datin bixwestin, ku ew tevaya Kurdistana Iraqê li dû xwe de bidin bisûtandin; belê wan didatin bixwestin, ku ew gelê Kurd li ser rûwê zemîna Kurdistanê de bi carekê ve bidin bihilanîn. Bi saxî ve bi sedan ve ji Zarokan, ji Manalan, ji Pîrek û Zilaman li bajarê Sulêmanîyî qehreman de didatin bibinaxkirin û bi saxî ve ew didatin biveşartin. Wan Qertelên Merovxwerên Basîyan bajar û gundên me, zom fl warên didatin bişewitandin fl bitextkirin. Lêbelê nigaşê Basîyên Efleqîyî faşî bi vala ve dihatin biderkevtin. Xebata miletê kurd, ya ku ew bi hezaran sal ve di dirêjbûna mêjûwê de ji pêle Somerî de ji berî bêtir ji pênc hezar sal ve bi xurtî ve ji bona man fl nemanê, ji bona hebûnê û jîyanê, ji bona azdîya Kurdistanê û serxwebûna wêna tête bikirin, dê ew ji bal Basîyên sêwên kotiyên mêjûwê de nêyête bidawîkirin; lêbelê xebata miletan di tevaya serpêhatîya dirêjî tirşî talî mêjûwa merovanîyê de di bin nîr û zînetên wisayî dir fl hov ve her fl her hatîye bigûr û bigeşkirin fl ew bi serkevtin fl serxwebûna welatê xwe ve hatîya bitac fl bixelatkirin fl Dujminên wehayî dir fl hov ji bona ser sergôyê mêjûwê bi hinera qanûnên jînê ve hatine bipengizandîn û ew li wêderê de

hatine bicî û biwarkirin.
Vê xebata hanê, ya ku ew her fl her bi qehremanî û mêrxasî ve hatîye bikirin, ya ku pê miletê me di dirêjbûna mêjûwê de li ber xwe de dayite bidan, di encamê dawî de li ser destên Pêşîyên meyî Mêdîyan de piştî xebateke pir dijwarî bi hezar salî ve bi beramberî Şahinşahiya Aşûrî ve der sala 512 berî zayînê de Babilon û Nineva datin birûxandin. Herwehajî Pêşîyên meyî Kardoxî derdekî pir giran di sala 401 berî zayênê de bi ser serê Serleşkerê Zeyzefonê Yunanî ve di derbasbûna wî de di nava Kurdistanê de dane bianîn, ya ku ew di Gelo miletek di seranserî mêjûwa xwe de rojekê ji rojan bi sazmendîyeke we tov ve bi nala sazmendîya basîyên faşî de dikarîbû bihata biserkevtin? Min di jîna
xweyî kurt de û di xwendakarî û lêveneradina dûr û dirêj de di tevaya mêjûwa
merovanîyê de carekê ji caran jî ji xwe re nedayite bidîtin, ku sazmendîyeke hovî
mîna sazmendîya Basîyi faşî di encamê dawî de hatîye biserkevtin; lêbelê hêjirbêtir
di seranserî mêjûwa merovanîyê de sazmendîyên wetov nala Basîyên faşî di
encamamê dawî de ji bona ruxandina û herifandina dewleta xwe dane bikarkirin.
107
mejuwa yunanî de di nivîsata Zeyzrfon de di "Vegerandina Dehhezarn" de bi dûr û dirêjî ve hatîye biniovîsandin û bitomarkirin. Basîyên faşîyên sêwî û zîçên Efleqî ji xwe re didatin bixwestin,
ku ew Kurdistana meyî sipêhî û ciwan bûka Rojhilata Navînî û dergûşa şahrestanîya merovanîyê bidin bikavil û biwêrankirin û pêrejî

meletê Kurd 1; ser rûwê zemînê de bidin bihilanîn, ku careke din nav û nîşana Kurd û Kurdistanê bi ser zimanan ve neyête bikevtin.
Miletê Kurd bi qehremanî û pehlewanî ve di bin Rêberîya Partîya Demokratî Kurdistan de bi Serokîtîya Barzanî ve li ber man û nema xwe de di sedsalê bîstan de didate bidan. Hêzên pêşverû û demokratên Ereb û herwehajî hêzên pêşverû, demokrat û aşîtîxwaz li seranserî cîhanê de û bi taybetî ve hêzên dewletên sosyalistî ve di bin Rêberîya Soyvyête mezin de bi xurtî ve pişta gelê Kurd di vê roja teng û tarî de di mêjûwa Kurdistana me de datin bigirtin.
Sovyêta mezin di huşyarîya xwe de ji bona Iranê, Turkî, Surî û iraqê de di sala ı963 de bi xurtî ve date bixuyanîkirin, ku ew bûyînên li bakurê Iraqê de têtin bikirin, yên ku ew li nêzîka sînorên Sovyête de bi dijî miletê Kurd ve têtin bikirin, ew metirsîyekê ji bona ser asayiş û berjewendîyên welatê Sovyêtê dide bixistin. Ew divên bêtin birawestandin. Em bi destgirtî ve bi beramberî wan ve nayêtin birawestandin. .
Bi piştgirtina dewleta Sovyêtî ve di 2 tîrmeha sala 1963 de Komara Gelêrîyî Mengolî date bibiryarîkirin, ku ew tawankarîya qirkirina miletê Kurd ji bal serdarîya Iarqê de ji bona ser civîna Heştdehî hatîyî ji komkirina giştîyî Yekitîya Netewan de di vê salê de bide bianîn. Herwehajî pêrejî di 9 tîrmeha wê salê jî de Serokê Şanda Sovyêtî pirsa Kurd ji bona ser civîna 36 ji Civata Aburîyî û Civakîyî Yekkirtina Netewan de di dema civîna de bi nala deqekê ve ji bona li ser axivtina wê de date bipêşkeşkirin û li ber destên wê de date bidanin, ku "Serdariya Komara Iraqê li ser siyaste qirkirinê de beramber bi miletê Kurd ve tête biçûyîn."
Ev tevde bi hev re ji bona piştgirtin û parastina miletê Kurd ji qirkirinê de dihatin bikirin, di dema ku Surî leşkerê xweyî Yermûk di

bin Rêberîya Fehed El-Şair de di hewara Basîyan de ji bona ser qirkirina Kurd dabû binardin û ew di 28. ıo. ı963 de di şerê Fişxabûr
108Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Û Bêxêr de ligel sipahê Iraqê de bi dijî Kurdan ve hate bibeşdarîkirin."
Ev leşkerê Basîyî faşîyi bi paye ve ji bona qirkirina Israila Duwem bi serbilindî û serkevtî ve weha xwe ji bona nava Kurdistanê de didate birakişandin. Wî weha ji xwe re didate bibawerîkirin, ku dê ew di nava Kurdistanê de ji xwe re bi seyranekê ve bête birabûn. Lêbelê Pêşmergên Qehremanên hêvî , vîn û evîna Kurdistanê Pehlewanên mîna Hurmuzê Aşûrîyî Qehremanê Pêş mergê Kurdistanêyî bi bê hempa ve bi canê xwe ve fêrkirineke mêrxasîyê bi bê nimûne ve ji bona Pêxwasên, Serwanên Huştirên Tazîyên Basîyên faşî dane bidan, ku leşkerê Yermukê di nava xaka Kurdistanî pakî perest de hate bitar û bimarkirin. Bi sedanji wan ve hatin bikuştin û pir çek û teqemenî li dû xwe de di gorepana şer de datin bihiştin û herwehajî bi dehan ve bi Dîl ve bi destên Pêşmerge ve hatin bikevtin û pir ji yên mayî ve ew hatin bibezandin û di Turkî re hin ji wan de dihatin biderkevtin. Ew bi darê zorê ve careke din bi ser şorî ve, belam vê carê bi dizî ve ji bona nav Surî hatin bivegerandin. Navên pehlewanên Kurdistanê Pêşmergên Baraznî li seransî dunyayê de careke din mîna navê Selah Eldîn dihatin biberz û bibalakirin û navê pêxwas ên faşiyên basîyên Ereb dihatin bigemarîkirin; jiber ku ew ji bona nava Kurdistanê de di bin wî durûjmî de hatibûn biçûyîn, da ku ew Israîla Duwem bidin biqirkirin.
Fehed El-Şair û Mohemed Teleb Hilal Fisfis Pehlewanên
Basiyan ne bes tenê bi rûsarî û rûreşî ve dihatin biderkevtin; lêbelêjî hêjî bi bêtir ve ew nala hemû Basîyên faşî ve ji bona qirkirina Israila Duwem de bi rast û durust ve bi Dizên şekalên xwe ve dihatin biderkevtin. Di dema ku Hurmuzê qehremanê Pêşmergê Kurdistanêyî

bi bê hempa ve, mîna ku Barzanî ew didate binavkirin, bi tîp û dêrên zêrînî ve nav û nîşanên wî di nava bextê rûpelên mêjûwa Kurdistanê de tête bitomarkirırı."

JO Ji xwe re di vî babetê hanê de bi dûr û dirêjî ve li nivîsta Circis Fethulah: Serdanek ji bona mêja nêzîk de, r. 80, Sitokholm sala 1998 de bidin biternaekirin

31Di dawiya havîna sala 1970 de Dara Tewfîq li ser Hurmuz de ji me re date

bigotin: ku Barzanî jê re dayite bigotin, ku heger rojekê Pêkerek ji bona Pêşmergên

Kurdistanê de bête biçêkirin, divê ew Pêkerê hanê bes û bi tenha ve bi Pêkerê

Qehremanê Hurmuz ve bête biderkevtin.

109

Hemû Serşorên Efser û Serbazên Yermuk di pêşandaneke

sipahîyî gewre de li bajarê Şamê de bi mîna Pehlewanan ve ji bal Serokê Dewleta Surî de General Amin El-Hafiz di 10. 1. 1964 de hatin bipêşewazîkirin û ew roja hanê bi mîrî ve bi nala "the most glorious day ever livid by the Arab Syrian people" - pîroztirîn roj ve di seranserî mêjûwa miletê Erebî Surî de hate bipesinandin-. General Amin El-Hafiz Serokê Surî ligel serdarîya xwe de Fehed El şair, Efser û Serbazên wî bi nala Qehremanên bi serkevtî ve pêşewazî li wan de dane bikirin. Di bersîva xwe de General Fehed El-Şair ji bona General Emin El-Hafiz date bigotin û wî date bidubarekirin, ku spahê wî .Jıad clean large areas of this etemai part of the Arab Fatherland which in Northem Iraq, from the separatist Barzani bands" -topraxeke mezin ji nava xakê welatê Bav û kalên Ereb de di Jorî Iraqê de ji nava destên Çeteyên Cihêvanê Barzanî de date bipakkirin-. Wî hêjîbêtir date

bigotin: "The Kurds in the Arab Fatherland enjoy all rights of citizenship but could have no spcial rights" -Kurd di nava welatê Bav û Kalên Ereban de ji wan re hemû mafeyên Nişînvanîyê têtin bidîtin, lêbele dê tu carî ji wan re mafeyekî bi taybetî ve neyête biderkevtin."-
Di dawî de General Emîn EI- Hafiz singên wan Fisfis
Qehremanên xwe bi xelatên nîşanên mêrxasiyê ve datin bixemilandin; jiber ku li Surî de weha bi reweşt ve dihate biderkevtin, çend Efseran ji ber Dujmin bidana bibazdan, weha deha sîngên wan bi xelatên nîşanên mêrxasîyê ve dihatin bixemilandin û bêtir pileyên payedarîya
32Ji xwe re bi dûr û dirêjî ve di vî batê hanê de: .Jntervetion of the Syrian Army- "
destdirêjiya sipahê Surî- di nivîsta Ismet Serîf Wanlî de bi zimanê Ingilizî ve: "The
Revolution of Iraki Kurdistan, Part 1, (From September ı96 l to Desember ı963), r.
,47 -44Puplished by the Committee for the Defense of the Kurdish Peoples rights,
)Kurdish Representation) Apri 1965, bidin bitemeşekirin.
Ev yekek ji nivistên pir bi nerx ve li ser şûreşê de bi zimanê Ingilizî ve ji Ilula sala 196 Ltanî befirbara sala ı963 de tête biderkevtin. Ew bi şêweyekî zanistîyi
pir bilind ve li ser vê pêla şureşê de dide biaxivtin, Kêm Kesan tanî neha wetov bi
zanistî ve, bi kurtî û givaşti ve mîna Ismet Şerîf Wanlî li ser vê pêla hanê de dayite
binivîsandin; jiber ku Ismet Şerîf Wanlî yekek ji gewretîn kamasên pirsa Kurd û

mêjûwa Kurd û Kurdistanê ve tête biderkevtin. Ew pir bi dûr û zanistî ve pêşbînîyê
ji bona çarekirina pirsa Kurd di serxwebûna Kurdistanê de û pêkanîna dewleteke
milîyî serbixwe ve di Rojhilata Navînî de dide bidîtin.
l LO Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
wan dihatin bibilindkirin. Ji bona nimûne di şerê Ereban û Cuhan de der salên 1967 û 1973 de di nava hîç sipahekî de di vê dunyayê de mîna di nava Sipahê Suriyî Efleqî de wetov nîşanên mêrxaniyê fl pilêyên Payedarîyê hatine bilevakirin, ne jiber ku ew bi gernasî û mêrxasî ve beramber bi Dujminên xwe ve hatibûn birewestandin, lêbelê jiber ku wan bi bê nimû ne di mêjûwa sipahîyê de ji ber Dujminên xwe dabûn bibazdan. Cudabûn di nava wan herdu şeran de li nik Sipahî Surî û Misrî de dihate biderkevtin, ku Sipahê Misrî bi pirbûn ve destên xwe ber bi Xwedê ve didatin bibilindkirin û xwe didatin bidîlkirin û Sipahê Surî xwe bi lez û bez ve ji rasta şer de didatin biderxistin û ber bi bajarê Şamê ve didatin bibezdan. Wan wetov ji dil û can ve bi mîna Kal û Pavpirên xwe ve didatin bibawerîkirin, ku rev bi nîvê mêranîyê ve tête biderkevtin. Dibe, ku ev taktîka şer di nava biyabanîya Ereb de bi sûd ve bihata biderkevtin; lêlêbelê ew di şêrê nava Kurdistanê de beramber bi Pêşmegên Qehreman ve û hirnjî di şerê Felestînê de bi beramberî Sipahê liberxwedanêyî Israilî ve nebes tenê bi rûsarî û şermezarî ve dihate biderkevtin, lêbelê hîjîbêtir ew li ser serên wan de bi destanekê ve dihate biderkevtin û ew ji wan re di encamê dawî de bi reweşt ve dihate biderkevtin. Bi Kurtî ve sipahekî wetov pir bi dir û hov ve û bi bêqam mêrxas ve bi beramberî Menal, Zarok, Pîrek û Rîsipîyan ve dihatin biderkevtin, lêbelê ew bi beramber Dujminekî Çekdarî mîna

xwe ve bi pîsî ve dihatin biderkevtin û her û her rev û bez ji wan re bi pişk û par ve dihatin biderkevtin. Merov bi rastî jî ve bi beramberî Dujminên wetov ve bi şermezar ve tête biderkevtin, jiber ku hîç mêrxasîyek têde ji bona bezandina Dujminên wisa nayête biderkevtin; jiber ku ew bi xwe ve ji bona bezê ji rasta şer hatine bidakevtin. Kurd bi vê rastîya hanê ve di bezên sipahên Ereb de bi beramberî sipahê Israilî ve hinekî lirnêrxasîya xwe de dihatin bigûmankirin.
Cento û Nato di rêya Iran û Turkîyê de didatin bixwestin, ku ew vê şûreşa hanê bidin bitemirandin. Şah û Turkan di sala 1963 de leşkerên xwe ji bona ser tuxûbên Kurdistanê de didatin bicivandin. Wan çavên xwe ji bona hêrîşekê li ser Kurd de didatin bibelkirin. Herwehajî wan Encumeneke hevkarîyê ligel Basîyan de li bajarê Musilê de dane bidurustkirin.
111
Di 20. 8. 1963 de Izgeha Dengê Kurdistan di cara pêşî de date bidestpêkirin. Wê tevaya derd, kul û hêviyên miletê Kurd bi rast û durustî ve ji bona tevaya bîr û bawerîya cîhanê ve date bigihandin; jiber ku Serdrarên Rehperestên Dagîrkerên Iraqê mîna hemû dagirkren Kurdistanêyî din perdeyeke pir giran û mezin ji agehdarî û ragiyandinên li ser miletê Kurd de dabûn bipoşandin.
Ev Izgeha hanê bi saya dewleta Sovyêtê ve bi şûreşê ve hate bigihandin. Berî vêna der sala 1962 de Izgehekî biçûk li Ewropa de hate bikirîn û ew ji bal Rêxistina Partîya Demokratî Kurdistan de li Ewropa de bi destên Fadil Gênc Elî, Şewket Hesen û Ehmed Neqîb ji Elmanya Fêderalî de di bin pir merc û zînetên dijwar de bi Otombêlekê ve ji bona Istenbolê hate bibirin û wan ew ji bona wan Kesên nîşankirî dane bidan û di paş re ew careke din ji bona Elmanya hatin bivegerandin. Belam ew Izgeha hanê ji bona Kurdistanê nehate

bigihandin û ew bi rê ve di ketina nava avê de·hate bipûçkirin.
Di vekirina vî dengê pîroz de Dengê Kurdistanê de bi gotinekê ve ji bal Barzanî de hate bivekirin, ya ku ew ji bal Serheng Dr. Seyid Ezîz Şemdînî de di piştî wergerandina wê de ji bona zimanê Erebî têde hate bixwendin.
Jiber giringbûna mêjûyî vê gotina hanê de ez wê careke din ji zimanê Erebî ji bona zimanê Kurdî zaravayê kurmancî didim biwergerandin; jiber ku nivîsandina wêyî kurmancî li nik min de nayête bidîtin.
Gotina Barzanîyî mêjûyî di vekirina Dengê Kurdistanê de:
"Miletê Kurdî xweşevist'
Berî her tiştî ez vê Izgeha hanê bi navê Xwedawendê Bilindî Hêja didim bivekirin û ez niyazmendim, ku dê ew ji bona me alîkarîyê bide bidiyarîkirin, da ku em li pên avê mafe, dadwerîyê fl rastîyê de bêtin biserkevtin.
Xweşk û birayên hêja!
Di nava van zînetên hanê de Dujmin hêrişeke bêbext û hovber ji bona ser miletê meyî Kurd dide bikirin, ez ji we tevan ji her car pêtir ve parastîna yekîtîya weyî welatî didim bidaxwazîkirin, jiber ku yekîtîya welatî bi bingehekî xurt ve û bi hîmekî bingehî ve ji bona her bi serkevtineke we ve tête biderkevtin; jibervêjî ve erek li ser tevaya Welatperwerên Kurd de dide bineçarîkirin, ku her yek ji wan di şerê

man û nemanê de bidin bibeşdarîkirin, yê ku têde miletê meyî Kurd xwe di nava agirê wî de dide bidîtin. Dujmin qirkirina miletê Kurd û talankirina welatê wîyî Kurdistanê dide biarmanckirin. Wî hîç rê li ber tu Kesekî de nedate bihiştin, ku ew bi bê alî ve bête birawestandin; jibervejî ve divê li ser her Lawekî pakî vî welatê hanê de bi mal, can û

xwîna xwe ve di beşdarîkirina vê şûreşa hanê de tu çavtengayekê nede biderxistin.
Birayên hêja!
Ji vir û derewên Dujmin nedin bibawerîkirin û ji giv û bivên wî nedin bitirskirin. Pir li li ser xapandin û fenên wî de wiryabin; jiber ku ev Keleşên hanê bi Dûndên pêşiyên xwe ve ji çepelê Qasimê gor bi gorkirî ve têtin biderkevtin. Xebata meyê hîmkirîyî xurt, ya ku wê hêmên serdarîkirina Qasim date bihejandin, dê ew bi yarmetîya Xwedawendê Bilind ve rev û şikenadina bi neçarî ve bi Destdireêjan jî ve bide bigihandin.
Birayên Hêja!
Divê ez ji we re nedim biveşartin, ku Basîyên Mêrkuj bi hîç awayekû ve miletê Erebî dost nadin biwênerîkirin; lêbelê ew him bi Dujminê miletê Kurd ve û himjî bi Dujminê miletê Ereb ve têtin biderkevtin.
Xebata hevbeşî di navbera herdu milîyên Ereb û Kurd de bi kevirê goşî ve ji bona parastina serxwebûna Iraqê û avanîkirina rêstikeke demokrasîyî sax ve û ji bona bi danîna Ewtonomî ve ji bona Kurdistanê tête biderkevtin.
Debera vîna miletê kurd di xebata wîyî rewa de li pênavê mafeyên wîyî milî de ûji bona Ewtonomî bête biserkevtin Herbijî Leşkerê Sûreşgêrê Kurdistan.
Di dawî dawî de hêz ji yekîtiyê de tête biderkevtin û biserkevtin li nik Xwedawend de tête bidîtin,,33.
Herwehajî di vê pêla hanê de Partîya Demokratî Kurdistan bangek ji bona Yekitîya Netewan, Serokên Dewletan û rêxistinên

33Ji xwe re li ser vê gotina Barzanî de. di rojnama Xebat de bi zimanê Erebî de, r. I û

8jimar 470, Ilona sala ı963 de bidin bitemaşekirin.
113
Navdewletî de date birêkirin. Jiber giringbûna vê banga hanê de ez dixwazim wê li vê derê de ji zimanê Erebî bidim biwergerandin û bitomarkirin. Divê li vêderê de bête bigotin, ku tu Mêjû lijêr vê banga hanê de nehatîye binivîsandin û ew bes û bi tenha ve di rojnama Xebat de jimar 470, Ilola sala 1993 de hatiye bibelavkirin. Ev bi deqa vê banga hanê ve tête biderkevtin:
"Banga Partîya Demokratî Kurdistan
ji bona
Sikretarîya Yekgirtina Netewan de
Civata Asayişa Navdewletê de
Serokên Dewletan de
Rêxistinên, Sindikatên Dam û Destgehên Navdewletî de, Rêxistina Xacê Sorî Navdewletî de, Dam û Destgehên Ragiyandinên Cihanî de
Ji du salan de miletê meyî Kurdî aşîtîxwaz bi tenha xwe ve li Kurdistana pêvekirî de ligel Iraqê de xwe di nava cengeke gemarî de dide bidîtin, ya ku ew ji bal Dujminekî de li ser de hatîye bineçarîkirin, yê ku ew bi baştirîn çekên kuştinê û wêrankirinê ve hatîye biçekkirin; jiber ku miletê Kurd bes û bi tenha ve biçûktirîn mafe ji xwe re dide bixwestin, yê ku ew jê re ji bal mafeyê çamûs de tête bidan û yê ku ew di mafeyê Ewtonomî de di nava dewleta Iraqê de tête biderkevtin.
Tevîjî ku welat ji serdarîkirina Qasimê Diktatorê bi tenha xwe jî ve hate birizgarîkirin û tevîjî ku hemû pêrabûn û hewildan ji bona çarekirineke aşîtî hatin bikirin, da ku ji bona miletê me hin ji mafeyên wî bêtin bigirawkirin û ceng bête bidawîkirin û aşîtî ji bona welêt û aramî ji bona heremê bête bivegerandin.

Lêbelê Çeteyên Basên faşî serdarîkirin bi tenha ve bi destên xwe ve dane bixistin, piştî ku wan di wergêrandina 8 reşmehê de di rêya siyaseteke sawkirîyî zordarî de' desthilatî bi destên xwe ve dane bixistin. Wan hîç guh bi dengê hiş ve nedane bidan û herwehajî wan guh bi serpêhatiyên mêjûwê ve nedane bidan. Wan tu pêk bi gift û goyan ve nedane bidan, yên ku ew di navbera wan û Wênerên me de dihatin bikirin. Wan ji xwe re di pêla gift û goyan de. kês didatin biwergirtin, da ku ew ji nû ve hêzên xweyî westyayî bidin birêxistin.

114Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

Wan ji nişkê ve dest bi şer ve dane bikirin û hwerwehajî wan bi dijî hemû yasayên vê dunyayê ve Wênerên me ji bona gift û gokirinê ligel wan de dane bigirtin û Endamên wî bi şêweyekî pir hov û dir ve hatin biazaradan. Herwehajî wan ji nişkê ve dane bidazanin, ku çûn û hatin di hemû bajarên Kurd de dane biqedexekirin, yên ku ew li jêr desthilatîya wê de dihatin bikevtin. Herwehajî wan kuştina her Kesekî Beramber bi bê agehdarîkirin û yanjî bi lê pirskirin dane biderxistin. Di nava vê zîneta hanê de wan kês ji xwe re ji bona kuştina bi dehan ve ji Neşînvanên bi guneh ve di nava bajaran de û bi sedan ve ji Gundîyên reben ve dane biwergirtin. Bi sedan ve Gundî wan datin bikuştin, gava ku ew di berbanga roja 9. 6. 1963 mîna her car ji bona nava bazarê hatin biçûyîn. Basîyan ew ber bi gulên rêjîrıkan, top û tankan ve dane bivekirin û ji wan bes û bi tenha ve di bajarê Sulêmanîyê de 267 Kes hatin bikuştin. Herwehajî mal û dukan jî hatin bitalankirin û biwerankirin û ji bona binê zindanan û axuran de bêtir ji 15 000 girtî hatin biavêtin û ew tûşî dir û hovtirîn rengên azardanîkirinêyî vejandî ji bal hişê Basîyî faşî hatin bikirin. Ji wê pêla hanê de û tanî neha de welatê meyî Kurdistana ciwan tûşî hêrîşîn asmanîyi pir ji bal balafirên cudan de tête bikirin, yên ku ew di nava

diyarên wê de agir, mirin û werankirinê didin bibelavkirin. Ew bê gunehan ji Pîr û Pîrekan ji Zarok û Menalan didin bikuştin. Ew zevî û bênderan didin bisûtandin. Ew mal û keşkan li ser serên Rûniştvanên wanî bê çek û reben de didin biherifandin. Ew terş û cenaweran didin biqirkirin. Belê ev cenga qirkirinê ji bal hêzên Ahrumend de hêzên mirinê û wêrankirinêyî Çetên Basîyî Serdar de li Begdadê de li ser kurdistanê de bi bê cudanbûn ve tête bidadan. Tevî li vê hêrîşa Hêtlerîyî Basî jî de ji kuştinê û werankirinê jî de serdarî bi hîç rengekî ve tu bi serkevtinên xweyî sipahî ve nedane bicîanîn.
Bêdengbûna li ser van serbirînên merovan îyê de û cenga qirkirina bi rêxistî ve bi hîç corekî ve ligel canê serdemê de nayête bilehevkirin, yê ku ew bi remanên merovanîyî pêşkevtî de tête bidagirtin û herwehajî ew bêdengînîya hanê jî ligel erek û kar û barên avetî ve ji bona ser milên Encumena Yekgirtina Netewan de û ji bona ser peymana wêna de nayête bi lihevkirin û herwehajî ew ligel sozdanên Endamên wê nayête bilihevkirin, yên ku wan rêzlêgirtina ji bona rêz û dirên dazanîna mafeyê Merov pê li ser xwe de dane

bisozdan Û herwehajî wan dane bisozdan, ku ew xebatê ji bona parastina asayîşê û aramîyê bidin bikirin.
Miletê meyî Kurd ji bal siyaseta rehperestîya hover de tête biazaradan, ya ku ew ji bal Keleşên Basîyan bi hesin û agir ve li ser wî de tête bicîanîn. Hegerjî ku Basî hêjî ji alîyê bi rêxistinê ve di siyaseta rehperestîyê de li pişt Efriqya Jêrê de tête biderkevtin, lêbelê ew bi şêweyê wêrankirinê ve bi gelekî ve li pêşîya wê de têtin biderkevtin. Wê tax û gerek bi carekê ve li bajarê Kerkukê de datin biwêranîkirin û wê xelkên wêyî bi jimara xwe ve bi çil hezar Kurd ve datin biderkirin, bes û bi tenha ve jiber ku ew bi Kurd ve têtin biderkevtin û ew ligel

Basîyan de bi tuxum û ziman ve bi cudabûn ve têtin biderkevtin. Di dirêjiya sînorê di navbera herema Erebî û Kurdistana Iraqê de serdarîyê hemû Kurdên aşitîxwaz û bêguneh dane biderkirin û ew bi revê ve datin bineçarîkirin, da ku ew jîna xwe bidin birizgarîkirin û wan hemû mal û malên xwe ji bona revandinê û talankirinê li dû xwe de dane bihiştin. Serdarîyê encumenêrı mîrî dane bipêkanîn, da ku ew Eşîrên Erebî li şûn û warê wan de bidin bineşîrıîkirin û da ku ew milk û malên wan Derkevtîyan li ser wan Eşîrên Erebî de bidin bibelavkirin. Herwehajî serdarîyê bi hezaran ve ji Karmend û kargerên Kurd ji ser karmendî û ji ser karên wan de dane biderkerin û wê bi siyaseta erebkirina faşî ve bi carekê ve beramber bi Kurd û Kurdistanê ve date bidestpêkirin.

Gotina serdarîyê ku pirsa me bi pirseke navxweyî ve têtе biderkevtin, ew bi gotineke vala û hîç û pûç ve têtе biderkevtin; jiber ku pir ji Zordaran û Sitemkaran ve xwe bi vê derewa hanê ve dane bigirêdan, da ku ew rê li berYekgirtina Netewan de bidin bigirtin û nehêlin ku ew bi erkên xweyî giring ve pê bête birabûn. Tevî li hemû pêrabûnên perîşanîyî ji de bêhêvî ji bal serdariya Efrîqya Jêrî û dewletên Impiryalî de di Encumena Yekgirtina Netewan jî de bi nehiştina gift û gokirirıê ve li ser siyaseta cudabûna di navbera rehperestîyê de bi mehna ku ew bi destdirêjîyekê ve ji bona nava kar û barên hundûrû ve têtе biderkevtin, lêbelê Encûmêrıê ew mehnên hanê date bivegerandin û wê ew siyaseta pêrabûna serdarîya Efriqya Jêrî bi dijî beşekî ji Neşînvanên xwe ve bi dijî bendên mafeyên Merov ve date bidanîn. Jibervêjî ve wê bi erkê xwe ve date bidîtîn, da ku ew sînorekî ji bona wê siyaseta hanê de bide bidanîn û Neşîrıvanan û

Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

Zordarîlêkiran bidin bibaprastin. Weha wê biryarek bi sizadana birîna

pêwendîyan bi carekê ve ligel wê serdarîya hanê de date bidan. Weha siyaseta serdarîya Basîyî faşî jî bi dijî miletê Kurd ve li Iraqê de di cewhera xwe de bi siyaseteke rehperestî ve tête biderkevtin, ya ku Kurd li gora wê de ji wergirtina mafeyên xweyî mî1î de têtin bibêpişkirin û ew ji bona bijavtina di nava milibûna Ereb de bi darê zorê ve û bi şêweyekî hoberî ve tête bineçarîkirin.
Pêrabûnêrı serdarîya Begdadê di Kurdistanê de ji siyaseteke kolonyalîyî sitemkar bi hîç rengekî ve ne ji alîyên şêwe û armancên xwe ve ji gilîyên derkevtî de ji bal hin miletên li jêr kolonyalîyê de bi dijî dewletên kolonyalî ve nayêtin bicudakirin. Magelo jiber ku Serdarên Kurdistanê ne bi Ewropî ve têtin biderkevtin, yanjî jiber ku welat bi abûrî ve bi paşkevtî ve tête biderkevtin, ku ev bi tenha ve didin bitêrkirin, ku nav bi dûxistina kolonyalîyê li ser wan Serdarên Kurdistanê de bête binayînîkirin û bêdengbûn li ser mêrkijûyêrı wan de divê bête bidîtin, di dema ku ew di nava kurdistanê de bi karî ve siyaseteke kolonyalîyî deha bi bedtir ve û bi hovtir ve ji siyaseta kolonyalîyê de pê têtin birabûn, ya ku ew pir bi dûr ve ji hêjabûnên merovan îyê ve û ji hemû hêjabûnên naskirî ve tête biderkevtin û ew bi gelekî ve bi dirtir ve û hovtir ve ji pêrabûna hovtirîn dewleta kolnyalî ve di berzbûna zordarîya wê de tête biderkevtin? Megelo hîç di nava dunyayê de welatekî kolonyalî destûrê bi sipahê xwe ve dide bidan, ku ew di her bêhnekê de bi xwedanê mafe ve tête biderkevtin, ku ew kuştinê, talankirinê, werankirinê û zindanîkirinê di her bêhnekê de ji xwe re li gora kêfa xwe de bi bêyî hiç sûcekî ve, bi bê hîç navbidûxistinekê ve û bi bê hîç dadgehkirinekê ve bide bikirin, mîna ku serdarîya Iraqê ew mafeyê hanê bi sipahê xweyî dagîrkirinê ve di Kurdistanê de li gora fermana komarîyî derkevtî de di 9. 6. 1963 de dayite bidan? Hêjîbêtir bi serdejî ve li ser şanê Yekgirtina Netewan de

têtе biderkevtin, jiber ku ew bi şûngera Hevgirêdana Netewan ve têtе biderkevtin, li ser milên wê de berpirsiyariyeke bi taybetî ve beramber bi pirsa Kurd ve di Iraqê de têtе biderkevtin. Jiber ku têtе bizanîn, ku Kurdistana jêrînî ango Kurdistana Iraqêyî neha ew bi welatekî ve têtе biderkevtin, ku piranîya pir ji xelkên wê ji miletê Kurd ve têtin biderkevtin. Ev Kurdistana hanê ne di nava dewleta Iraqê de dihate biderkevtin, ya ku Ingilistanê ew di nava welatê herdu çeman de der
117
sala 1922 de date bipêkanîn, lêbelê Kurdistan der sala 1926 de ligel Iraqê de hate bipêvekirin, ya ku ew li ser bingehê biryara Hevgirêda Netewan de li ser bingehê dengdaneke bi nav ve date bikirin, ya ku ew ji bal wê de hatibû bikirin û ew li gora merc û temînîyên Hevgirêdana Netewan de hate bikirin, ji yên ku dewleta Iraqî û Ingilistanê bi hûr ve pê datin bisozdan. Herwehajî careke din jî serdarîya Iraqê bi sozên dayînî ve ji nû ve der sala 1932 pê hate birûniştin, gava ku ew bi Endam ve ji bona Hevgirêdana Netewan de hate bigirtin. Lêdana serdarîya Iraqê ji bona wan mercên sozdayî û pêrabûna wêna bi şerekî gemarî ve ji bona ser miletê kurd de ji bona erebkirina wî na yanjî ji bona derkirina wîna, yanjî ji bona qirkirina wîna û kirina Kurdistanê bi beşekî ji welatê Ereb ve û bi bê pêşkirırıa Kurd ve ji hemû rnafeyên wîyî merovanî, demokrasî û milî ve ev hemû bi hev re pir bi tirs ve têtin biderkevtin û hêjîbêtir ew bi pêlêbûnekê ve ji bona bîr û bawerîyên Yekîtîya Netewan de, ji bona rewaya mafeyên merov û hêjabûnên sincîyî zalkirî di nava merovan de têtе biderkevtin. Hêjîbêtir ew bi lêdanekê ve bi carekê ve û bi nayînkirinekê ve ji bona hemû mercên peymanê ve têtin biderkevtin, ya ku li gora wê de Kurdistan bi ser iraqê ve hate bivekirin; jibervêjî ve divê li ser Yekîtîya Netewan de destdirêjiyê ji bona vegeradina mercên wê

peymana hanê bide bikirin, yên ku ew li gora canê serdemê û 'pêşkevtinên demê de dihatin biderkevtin û herwehajî da ku ji bona miletê Kurd mafeyê wîyî bi carekê ve û azadîya wîyî bi carekê ve bête bidan, riebes tenê ji bona bi yekkirina wîna ve ligel Ereb de di nava yek dewletê de bête bijîyandin yanjî na, lêbelê jî divê mafe jêre bête bidan, ku magelo ew dixwaze li jêr sîbera serdarîya Basîyî neha de Dujmina Ereb û Kurd de bête bijîyandin?

Li ser yên çûyînî de penabûna serdarîya Basî ji bona qawînê rizyayî ku cenga qirkirina vêkevtî di Kurdistanê de ji kar û barên wêyî hundurû ve tête biderkevtin û ji mafeyê dewletên aşîtîxwaz û pêgirtîyên bi peymana mefeyên merov ve nayête biderkevtin, ku ew wan kar û barên Basîyan di Encumena Yekîtîya Netewan de li ser de bidin bigiftûgokirin. Ev derewên Basîyan di ser miltên dunyayê û dewletên wanî evîndarî ji bona azadîyê û aşîtîyê de weha bi hêsanî ve nayête bibuhurandin. Lêbelê çavgirtin ji bal Yekîtîya Netewan de li ser vê birîna merovanîyê de di nava kurdistana Iraqê de û xwe jê

L L 8 Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

bidûrkirin bi bê guhpêdaneke diyar ve û kêmanîyeke mezin -ve beramberî wan erkên hildayî li ser milên wê de ji bona parastina miletan ji zordarîyê, ji tirsê û ji sitemkarîyê tête biderkevtin. Weha berpirsiyarîya mêjûyî û merovanîyê ji her dewletekê Endam de di Yekîtîya Navnetewan de bi xurtî ve tête bixwestin, ku ew sînorekî ji bona vê cenga hanê bidin bidanîn, ya ku ew ji bal serdarîya Basîyî faşî de li ser miletê Kurd de tête bidadan û divê ew xweser ji bona yarmetiya vî miletê sitemkêş bi hemû şêweyên alîkariyê ve çi bi çanî ve yanjî bi bojeyî ve bidin bikirin.

Miletê me neha tûşî pîstirîn û firehtirîn hêrîşkirina qirkirinê tête bikirin, ya ku miletek ji miletan di nîvê duwemî vî sedsalê bîstan

de pê hatîye bihêrîşkirin, Bi dehan hezar ve ji Pîran, ji Zarokan û Pîrekan têtin bibêcî û bibêwarkirin û li vir û dera hanê de hatine bitar û bimarkirin. Dujmin xanî û keşkên wan dane biherifandin, mal û cihên wan dane bişewitandin û terş, mer û malatên wan dane bikuştin. Ew di nava zînetekê de têtin bidîtin, ya ku ew bes û bi tenha ve bi serên wan kesan ve hatîye bihatin, ji yên ku ew di pêla cenga duwemî cîhanî de li jêr bombebarandina asmanî ve ji bala balafirên cengînî ve dihatin biderkevtin. Ew bi pêwistî her rengekî ve ji alîkarîyê de têtin biderkevtin, hegerjî çendjî ku ew bi sade jî ve bêtin biderkevtin. Belê ew bi pêwistî dildarîya merovaniyê ve têtin biderkevtin, belê hêjibêtir ew bi pêwistî bi gotineke xweş ve ji bal Qencvanan û Merovan ve têtin biderkevtin. Magelo li kû derê de Merovên Xêrxwaz têtin biderkevtin û bidîtin, da ku ew li ber dilên Gorîyên Bombebarandinên asmanîyî tawankarî de bidin bikirin, da ku ew wan ji mirinê ji ber nebûna dermanan bidin birîzgarîkirin, na hêjîbêtir ma kanî li kû derê de Encumerıên Parastina Cenaweran têtin bidîtin, da ku ew bi dehan hezar ve ji terş û cenaweran ji bal hêrîş ên bombebarandina asmanî de li herema Şarezor de ji bona nimûne bidin birizgarîkirin, jiber ku balafiran bi rêjînkêrı xwe ve pênc hezar serî ji pez û bêtir ji hezar serî ji bizinan de dane bikuştin?

Em dixwazin ji xwe re bidin bixuyanî kirin, ku hîç li ser rûwê zimînê de hêzek nikare li ser me de bide bizordarîkirin, ku em bi vê rewş û jîyana hanêyî neha ve pê bêtin birûniştin, yanjî dê ew bikaribe rê li ber me de bide bigirtin, ku em li ser xebata xwe ji bona mafeyên xweyî milî û demokrasîyî rewa neyêtin biçûyîn, hegerjî çendjî dema

vê xebata hanê jî bête bidirêjkirin û heger jî çendjî gorîyên wê jî bêtin bigewrekirin. Miletê meyî Kurd dê ji tevaya cîhanê re bide

bieşkerekirin, ku ew ne bi kêmtir ve ji miletên din de li ser parastina hebûna xwe de têtе biderkevtin û herwehjî amadebûna wîna dê ne bi kêmtir ve ji bona liberxwedana mafeyên xwe de bête biderkevtin.
Beramberî vê vîna miletî bi carekê ve û beramberî çûna Keleşên Basîyên faşî li ser siyaseta xweyî tawankarî de em ji bona we didin bibangkirin, ku hûn bi lez û bez ve destdirêjîyê bidin bikirin, da ku hûn li ser serdarîya Iraqê de bidin bizordarîkirin, ku ew vê cenga gemarî bîne bidawîkirin û daxwazên miletê meyî rewa di wergirtina ewtonomî de di Kurdistana Iraqê de bide bicîanîn. Herwehajî em ji bona we didin bibangkirin, ku hûn biryarekî bi qedexekirina firotina çek, kel û pelên cengêyî din ji bona dewleta Iraqê de tanî bi dawîkirina vê cengê ve bidin biderxistin, herweha jî em ji bona we didin bibangkirin, ku hûn temînî û xwestîyên pêwist ji bona hemû dewletan bidin biderxistin, da ku ew hemû alîkarîyên karîni ji bona miletê meyî Kurdî xebatvan bidin bipêşkeşkirin, da ku ew di xebate xwe de ji bona mafeyên xweyî milîyî rewa de û ji bona bi lezbûn û bi dawîanîna azaradarîya xwe û zordarîya xwe ve bête bialîkarîkirin.
Em ji bona hemû miletên vê cihanê de didin bibangkirin, ku ew bi erkên xwe ve beramberî miletê meyî Kurd ve çi di warên givaştinê de li ser dewletên xwe de û yanjî çi di warên pêşkeşkirina alîkarîyên bêwist de bêtin birabûn û herwehajî ku ew siyaseteke dostanîyê beramber bi Kurd ve bidin bigirtin û jê re yarmetîya xweser çi bi canî ve yanjî bi bojeyî ve bidin bipêşkeşkirin. .
Herwehajî em ji rêxistinên merovanîyê û qencîyê ve di tevaya cîhanê de û herwehajî bi taybetî ve em ji bona rêxistna xacê Sorî navdewlî jî de didin bixwestin, ku ew bi erkên xweyî merovanî ve bêtin birabûn, da ku ew barên li ser van Gorîyên cengê de bidin bisivikkirin û ew Wên erên xwe bidin birêkirin, da ku ew li ser zîneta

Kurdistanê de bidin bilêkolandin û alîkarîya bi pêwist ve di jêr rewşên wetov de bi leztirîn dem ve jêre bidin bipêşkeşkirin.

120Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

Di dawîya dawî de Deftera Siyasîyî Partîya Demokratî Kurdistan xwe bi bextiyar ve dide bidîtin, ku vê kêsa hanê ji xwe re bide bidîtin, da ku ew rêz û silavên xwe ji we re bide bipêşkeşkirin. Deftera Siyasîyî Partîya demokratî Kurdistan.":'

Heger Merov ji xwe re bi hûr û kûrî ve li vê banga hanê de bide bitemaşek ..m, merov dikare van rûnkirinan ji xwe re li ser de bide biderxistin:

Ev banga hanê, heger ku ew ji bona Kurdan bihata binivîsandin, dê dûr yanjî nêzîk ne bi xerab ve bihata biderkevtin.

Ev banga hanê ji bona wan Rêxistinên Netewî û Navnetî de bi şêweyekî pir sert ve hatîye binivîsandin û dûr yanjî nezîk ew ne bi şêweyekî diplomasî ve hatîye binivîsandin. Ew li gora dilbijandinê û fermankirinê de hatîye binivîsandin. Li hemû dunyayê de Merov dikare yarmetîyê ji miletê xwe bide bixwestin; belam divê ku Merov yarmetîyê ji miletên din de bide bihêvîkirin.

Ev şêweyê remankirina hanê di darêjtina pirsa milî de bi şêweyî Erebî ve ji bona darêjtina pirsa Felestînê ve ji bona bîr û bawerîya cîhanî ve bi bîra Merov ve dide bixistin, ya ku ew her û her bi bêkir û bi bê sûd ve dihate bimayîn; jiber ku ew mîna vê banga hanê ji bona miletê Ereb de dihate binivîsandin û ew ne ji bona miletên din de lijêr ferhengên din de dihate binivîsandin.

Ev banga hanê bi navê Deftera Siyasîyî Partîya Demokratî kurdistanê ve ji bona wan Rêxistinên Netewî û Navnetewî de hatîye binardin, ku li gora Peyrew û Pirograma Partî de divabû her pêwendiyek ji bona derve bi navê Serokê Partî Barzanî bihata bikirin.

Di vir de Deftra Siyasî serê duberîyê di nava xwe de û Barzanî de dide biderxistin. Emê dê di piştî vê de vê duberîya hanê bêtir û bêtir û bi eşkeretir û tujtir ve ji xwe re bidin bidîtin.

34Ev banga hanê bi bê mêjû ve di rojnama Xebat de, jimara 470, i\ola sala 1963 de,

r. 1 û 5 de hatîye bibelavkirin.

121

Hemû bang û bibîrxistinên rêkirî ji bal Baraznî de yanjî ji bal Wênerên wî de ji bona Rêxistinên Netewî û Navnetewî de bi şêweyekî diplomasîyî pir bilind ve têtin biderkevtin û ew xwe bi carekê ve ji vî şêweyê remankirina xav û dilbijandinê ve didin bidûrkirin. Bes û bi tenha ve ew bi şêweyekî diplornasîyî zanistî ve têtin binivîsandin û birêkirin. Bes û bi tenha ve ji bona nimû ji xwe re li bangên rêkirî de bi navê Barzanî ve ji bal Ismet Şerîf Wanlî û Kameran Bedirxan Beg de bidin bitemaşekirin, ku di nava wan de tevaya diplomasîya bilind li ser zanistî û hişmendîya Ewropê de tête biderkevtin.

Tevlivêjî de ev banga hanê rastîyên hovberîya siyaseta Serdarên Iraqê beramber bi miletê Kurd ve dide binivîsandin û Merov dikare ji xwe re pir agehdarîyan li ser wê pêla hanê de bide bigirtin û jê ji xwe re bide bisûdkirin.

Bi saya xebata gelê Kurd, hêzên Erebîyî pêşverû ve û herwehajî bi saya piştgirtina dewleta Sovyêtî Partîya Leninî mezin ve şûreşa Kurdistanê ji rûxandinê hate biparastin.

Borcuwazîya Kurdî gen û genî ev rastîya hanê date bijibîrakirin û wê ji xwe re didate bixwestin, ku ew hêjîbêtir vê rastîya hanêyî bingehî di mêjûwa şûreşa Kurdistanê de bide bijibîrakirin, ku di encamê dawî de ev jibîrkirina mêjûwa şûreşa meyî hanê ji bal Borcuwazîya me de bi hoyên rûxandina wêna ve der sala 1975 de

hatin biderkevtin.
Belê şûreşa Kurd hate biparastîn û rêjima Basîyî faşî li ser destên Abdul-Selam Arif de di 18. 11. 1963 de hate birûxandin û ev bi kurtî ve bi hoyêwê rûxandina Basîyan ve têtin biderkevtin:
Dujminatîya di navbera A. S. El-Sadî û Abdul-Selam Arif de dihate biderkevtin; ji ber ku Sadî didate bixwestin, ku ew bi Rehber ve bête biderkevtin.
Dijminatîya di nava Sipah û Pasevanên Milî de dihate biderkevtin.
Iraq ji bal Mişêl Efleq û General El -Hafiz Emînê Surî de dihate biserdarîkirin û diktatorîya Partîya Pasî dihate bizalkirin.
Miletê Iraqê bi giştî ve bi dijî rêjîma Basî ve dihate biderkevtin û tawankarîyên ji bal Endamên Pasewanên Milî de pir bi bed ve ji bal gel de lê dihatin biteınaşekirin.
122Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Bi semekevtina Basîyan beramber bi şûreşa Kurd ve dihate biderkevtin."
Wî ji xwe re şûna wan date bigirtin û lihevhatineke demî ji bona rawestandina şer di navbera Arif û Barzanî de der 10. 2. 1964 de hate bikirin. Şer li Kurdistanê de hate birawestandin û miletê Kurd piçekî bêhna xwe ji xwe re date bivedan.
Di vê demê de di sala 1964 de di navbera Barzanî û Hevlaên Ibrahîm Ehmed de di partî de cudabûneke mezin hate birûdan". Tevî ku ji layekî jî de hewildan ji bona lihevhatinê de hatin bikirin, ew cudabûna hanê nehate bihîlanin, ya ku Ibrahîm û Hevalên xwe dixwestin Barzanî bi handan û yarrnetîya Iranê ve bidin biavêtin û ew rêberiya Partî û şureşê ji bona nava destên xwe bidin bixistin. Wan Barzanî bi biryarekê ve ji Sorokitîya Partî dane bixistin û şer di nava hêzên wan û hêzên Barzanî de hate bivêkevtin û ew hatin bişikestin û

di rêya Hemedan de di sala 1964 de wan berê xwe ber bi Iranê ve dane bivekirin. Di pişt re Barzanî li wan de hate bibuhurandin û ew ji bona nava şûreşê hatin bivegerandin, belam di bin re her pêwendiyên Ibrahîm Ehmed û hin ji Hevalên wî ligel serdarîya Iraqê de dihatin bikirin û ew der sala 1966 de ji bona Begdadê hatin biçûyîn û li nik serdarîyê hatin bimayîn û di destpêkirina şer de wan ligel Sipah û Caşan de bi dijî şûreşê û Pêşmerge ve tanî peymana 1ı avdara sala 1970didatin bişerkirin û ew bi navê Caşên Şêst û Şeş ve ji bal miletê Kurd de di seranserî Kurdistanê de hatin binavkirin û ew bi wî navî jî pê hatin bixelatkirin. Careke din Barzanî di piştî peymana avdarê de li wan de hate bibuhurandin û ew ji bona nava dam û destsgehên şûreşê de hatin bivegerandin. Ew di nava şûreşê de û ligel şûreşê de bi jêhatî ve û bi dil û can ve hatin bimayîn û bi dil û can jî ve wan pişta siyaseta 35Ji xwe re li nivîsta Ismet Şerîf Wanlî de: "The Revolution of Iraki Kurdistan- "

Şûreşa Kurdista Iraqê-, Published by the Committee for the Defense of the Kurdish

Peoples rights (Kurdish Representation) April 1965, r. 51 bidin bitemaşekirin.

36Ji xwe re di vî warê hanê bi dûr û dirêjî ve li nivîsata Circis Fethulah de:Serdanek

ji bona mêja nêzîk de, r. 34-42, 107 û 124-127 de bidin bitemaekirin. Kêm Merovan

wetov bi zanistî ve li ser vê cudabûna hanê ve dayite binivîsandin.

123

şûreşê didatin bigirtin. Ew di liberxwdana sala 1974 de bi dijî rêjîma Basîyî faşî ve hatin bibeşdarîkirin û ew jî mîna hemû Pêşmergên Kurdistanê di piştî kevtina şûreşê de ji bona Iranê hatin biçûyîrı."

Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de ew rûdanên gewreyî giran û pir bi derd ve him ji bona tevaya Xwendevanên cihanê û himjî ji bona tevaya bîr û bawerîya cîhanê de didate bigihandin û ji wan daxwaza piştgirtina meletê Kurd û şûreşa wîyî pîroz di bin serokitiya Barzanî de didate bixwestin.

Abdul-Selam Arif ji dêlva ku ew pirsiyara Kurd bi şêweyekî demokrasî ve li gora qazanc û berjewendiya miletê Iraqê de bi Ereb û Kurd ve bide biçarekirin, wî xwe bi xurtî ve ji bona cengê li ser Kurd de didate biamadekirin. Vî Nîvdinê Milîvanê Ereb hîç bawerî bi canê demokrasîyê ve nedidate bikirin û hêjîbêtir wî nizanîbû, ku ev gotina hanê di ferhenga siyasî de têtе bidîtin, Belê wî jî mîna hemû Serdarên Iraqîyî berî xwe ji xwe re didate bixewinkirin, bê kanî çilo dê ew ji xwe re bi başî û hêsanî ve vê veşartoka hêza liberxwedana Kurd bide bişikenandin. Heger ku ew wê ne bi aşîtî ve bide bişikenandin, wetov divabû ku ew wê bi şer û cengê ve ji nû ve careke din bide bişikenadin. Wehajî mîna Serdarên Iraqîyî berî xwe wî jî ev girêga veşartina hanê pê jî nehate biçarekirin û bivekirin.

Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de her û her mîna her Kurdekî didate bixuyanîkirin, ku bes û bi tenha ve çarekirina pirsa Kurd li Kurdistana Iraqê de dikare di rêya demokrasîkirina civaka Iraqî de bête biçarekirin. Hêjîbêtir pirsa Kurd li seranserî Kurdistanê de bi ceng û şer ve, bi wêrankirin û qirkirinê ve ji bala Serdarên Rom, Ereb û Ecem de nikare bête biçarekirin. Ew bidestên xwe ve bi wan ceng û şeran ve di nava Kurdistanê de gora xwe bêtir didin bikûrkirin û ji bona serxwebûna Kurdistnê de û pêkanîna dewleteke mîl têde bi leztir ve ji me Kurdan ve didin bikarkirin.

37Ji xwe re bi dûr û dirê jî ve li ser vî babetê hanê de di nivîsta bi zimanê Erebî ve:

Tevgera Azadîxwaziya Milîyî Kurd ji Barzanî tanî Mesud Barzanî, nivîsta duwem, ji
bal Ebdul-Qadir Birîvkanî, r. ıos - ı ı3 de, çapa yekem, Qahire, Misir sala ı998 de
bidin bitemaşekirin.
ı24 Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Hatina Abdul-Selam Arif ji bona ser deshilatîya Iraqê de di
sala 1964 de
Ne Diktatorekî Dînî mîna Abdul-Kerîm Qasim û ne jî Nîvdînekî milîyî mîna Abdul-Selam Arif hîç nikarîbûn vê pirsiyarîya mîlî di nava Kurdistana Irqê de bidin biçarekirin. Herwehajî Serdarên şovînîyî din rojekê ji rojan nikarin vê pirsa Kurd di seranserî Kurdistanê de bidin biçarekirin. Çarekirina pirsa milî di nava welatekî pir milî de bes û bi tenha xwe ve di rêya demokrasîkirina civaka wî welatî de dikare bête biçarekirin û herwehajî pêrejî divê rûnîştîna bi mafeyê çarûsa Netewan ve bête biderkevtin. Çi gava ku ev merc û bendên haneyî bingehî ji bona çarekirina pirsa milî di nava welatekî pir milî de nehatin bidîtin, dê ew welataya her û her xwe di nav ceng û şeran de bide bidîtin, tanî ku dewleta wîyî sitemkar û bedkar jihebv bête bixistin û ew miltên di nava wê de bi mafeyên çarenûsa xwe ve bi neçarî ve di serxwebûn û pêkananîna dewleteke xweyî milî de bêtin bigihandin.
Jibervêjî ve Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de li ser bingehên serpêhatîyên miletan de di çarenûsa wan de her û her didate bibîrxistin, ku pirsa milî li Kurdistana Iraqê de li jêr rewş û zînetên nişankirîyî mêjûyî de bes û bi tenha ve di wê demê di rêya berzkirina durujmê Demokrasî ji bona Iraqê û Ewtonomî ji bona Kurdistanê bi rast û durust ve dihate biderkevtin; jiber ku di rêya vê daxwaza hanê

de bêtir me dikarîbû armancên xwe bi hemû sadebûn û qulbûna wan ve ji bona serxwebûna welatê xwe di encamê dawî de bidin bicihanîn û Dujminên xweyî Serdarên Iraqê bi hovber ve bi rast û durust ve beramberî tevaya dunyayê bîr û bawerîya wêna û cewhera wan bidin bitazîkirin; jiber ku ew bi hîç rengekî ve bi tu mafeyên Kurdî rewa ve nedihatin birûniştin û hêjîbêtir bi wê serûştîya xweyî faşî ve ew tucarî jî pê nikarîbûn bihatate birûniştin, yanjî ew pê bêtin birûniştin.

125

Jibervêjî Barzanî pir bi jîrbûn û hozanî ve li ser têgihiştina serûştîya Dagîrkerên Kurdistanê de û li ser bingehên serpêhatîyên miletan de di xebata wanî rizgarî de daxwazên xwe timî biçûktir ji karînên xwe didate bixwestin. Herwehajî her û her daxwazên wî ji biçûk ber bi mezintir ve, ji jêr ber bi jor ve dihatin biderkevtin. Vê siyaseta zanistîyî rast û durust di encamê dawî de roj bi roj ve siyaseta Serdarên Iraqê beramberî bi çarekirina pirsa Kurd ve di rêya şer û ceng de bêtir û bitir bi ber kavilbûnê ve ditate biderxistin û hêjîbêtir wê ew beramberî tevaya bîr û bawerîya cîhanê bi nala kolonyalîya Portugalî û sipanî ve di sedsalên panzdehan de di Emerîka Latinî de yanjî bi nala siyaseta rehperestîyî serdarîya Efriqya Jêrî ve beramber bi miletê wê ve di vî sedsalê me de ditate biderxistin.

Bi ceng û şer ve ji bal Rehperestên Faşîyên Basîyên Ereb de xebata gelê Kurd li Kurdistana Iraqê de nayête birawestandin û bitemirandin; lêbelê ew roj bi roj ve di nava cerg û hinavên miletê me de dihate bixurtkirin û hêjîbêtir ew di seranserî Kurdistanê de bi şiyarbûna milî ve dihate bigeşkirin. Çend siyaseta Şovînî û Faşîyên Ereb bi dir û hovtir ve beramber bi miletê Kurd ve li Kurdistanê de dihate biderkevtin, weha deha xebata ji bona serxwebûna Kurdistanê û pêkanîna dewleteke milî bêtir cihê wê di nava nîvê dilên Kurd de

dihate biqulkirin û hêvîya bi cîanînê vê armanca perest bi nêzîktir ve dihate biderkevtin.
Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de, ya ku wê xwe bi beşekî pir biçûk ve ji xebata gelê Kurd didate bidîtin, her û her wê xebat ji bona durujmê Demokrasî ji bona Iraqê û Ewtonomî ji bona Kurdistanê didate bikirin; jiber ku di vî durujmê hanê de tevaya berjewendîya Kurd û Ereb dihate bidîtin û herwehajî têde pir pirsiyarîyên dijwar li pêşîya gelê Iraqî de dikarîbûn bihatana biçarekirin, da ku li Iraqê de pêşkevtina civakî û geşbûna abûrî bihata biderkevtin, da ku bextiyarî û xweşbûna jînê di tevaya civaka Iraqê de bihata biderkevtin û da ku ew ji bona çarekirina pirsa Kurd li seranserî Kurdistanê de di nava Kurdistana Tukiyê, Kurdistana Iranê û Kurdistana Suryê de bi nala nimûne ve bihata biderkevtin. Wetov Miletê Kurd di Kurdistan de ligel miletên wan welatên hanê de dikarîbûn hemû bi xweşî û bextiyarî ve di nava civakeke demokrasî de

bihatana bijîyandin. Wetov bi vî rengê hanêyê demokrasî ve pirsa mîlî di nava pir welatên bajartî de hatîye biçarekirin.
Arifê Yekem, piştî ku wî Basîyên faşî li Iraqê de dane biserkutkirin, careke din ji nû ve wî xwe ji bona şer û cengê li ser Kurdistanê de didate bilikarxistin û di encamê dawî de şerekî giran li ser gelê Kurd de careke din di 4. 4. 1965 de date bivêxistitin."
Lêbelê Pêşmegrên qehreman û mêrxasên Kurdistanê, hêvîya jîn û evîna gelê Kurd di bin Rêberîya Barzanî de mîna şêr û pilingan bi vîneke polayî ve li ber şovînizma Erebî de di durujmê: Kurdistan yanjî neman de hatin birawestandin.
Hemû miletê Kurd di seranserî Kurdistanê de bi dil, bi can û bi mal ve ji bona vê xebata dujwar didatin bipiştgirtin û ew xebata hanê

bi şev û roj ve di nava cerg û hinavên wan de dihate biderkevtin û Pêşmergên Kurdistanê di bin Rêberîya Barzanî de bi cerg û hinavên wan ve dihatin biderkevtin; jiber ku ew bi hêvîya jîna wî ve di rizgarîkirina Kurdistanê de ji jêr pencên Dagîrkerên Erebên faşî ve dihate biderkevtin.

Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de bi tevaya tuwana xwe ve, bi hemû karinên xweyî biçûk ve li seranserî Ewropa de bi dilgermî û xwîngermî ve, bi dil û can ve pişta vê şureşa Kurd û liberxwedana wîna de didate bigirtin. Wê şovînizma hoberîyî Erebî li seranserî cihanê de bi jêhatîbûnên xwe ve di hemû waran de didate bi qût, birût û bitazîkirin, bê çawan ev çavsorên şovînîyên Ereb dixwazin, ku ew dewlemendbûna welatê me ji xwe re bidin bitalankirin û hêjî bi serde jî ve miletê Kurd di vî sedsalê bîstan de ji xwe re bidin bikole û bibendekirin, na hêjîbêtir ew dixwazin wî bidin biqirkirin.

Di cara pêşî de di mêjûwa xebata Kurdan de xwe pêşandaneke Kurdan di nava Dewletên Hevgirtîyên Emerîka de di 21. 9. Sala 1965 de li beramberî Yekgirtina Netewan de di roja destpêkirina vekirina 38Li gora belavkirinekê de li ser Nûçeyên Kurdistan de ji bala Encumena bi rêvebirina giştîyî Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de di meha cotana sala 1965de hatîye binivîsandin, ku pêra bûn ên vî şerê hanê rast û durust di ıo. 4. 1965 de dayit bidestpêkirin.

wêyî giştî de hate bilidarxistin. Di vê xwe pêşandana hanê de jimareke kêm ji Kurdan bi cil û bergên xweyî milî ve û ligel hin Emerîkî jî de

çend demjimaran bi hildana çend durujman ve li ser armên xwe de mîna: .United Nations! Stop Genocide Against the Kurd in Iraq-" Yekgitina Netewan qirkirinê bide birawestandin-, Forgotten, But Not Defeated! Suport the Kurds"-hatine bi jibîrkirin, lêbelê nehatine bişikenandin! Pişta Kurdan bidin bigirtin, "Kurds are Entitled to Human Rights Too"-Kurd jî mafeyên Merovanîyê ji wan re têtin bidîtin, " Self-Determination for the Kurds", etc- çarenûs ji bona Kurdan, ûhd- li ber dergehên Yekgirtina Netewan de dihatin û diçûn."
Herwehajî li vêderê de ez vê nameya Barzanîyî hanê jiber girinbûna wêna ji bona bîr û bawerîya cîhanî li ser pirsa Kurd de di Kurdistanê Iraqê de ji zimanê Erebî de didim biwergerandîn û wê li vêderê de ji bona Xwendevanan didim bitomarkirin:
,,Bibirxistina Barzanî ji bona Encumena Yekgirtina Netewan de
Ji bona Sikretêrê Encumena Yekgirtina Netewan de
Ji bona Encumena Mafeyên Merov de
Ji bona Encumena Nemankirina Kolonyalîyê de
Ji bona Serokên Wênerên Dewletên Endam di Encumena Yekgirtina Netewan de
Hêjayan
Ji nêzîka derbasbûna çar salan de û welatê me Kurdistana Iraqê bi cengeke rehperestî û şovînî ve tête birûkirin û li ser serdarîkirina desthilatîya Iraqê de sê pêlên doktatorîyî sipahî li dû hevdû de hatine bihatin. Dirêjbûna vê cenga hanê jî bi dirêjbûna cenga cîhanêyî yekem ve û ew bi çend mehan jî ve bi kêmtir ve ji dirêjbûna cenga cîhanêyî duwem ve tête biderkevtin. Çekên mirinê û wêrankirinê ji balafiran, tank û topan ve, ji yên ku ew ji bal serdarîya iraqê de di vê cenga destdirêjîyî hanê de bi dijî miletê Kurdî rebenî bi bêçek ve tête bikaranîn, bi gelekî ve ew ji wan çekan de di wêrankirina xwe de têtin

39The Kurdish Jorrıal, Vol. Il, September, December 1965, r. 2, . Pulished by the
Kurdish Student Organization in the USA. Ev Kovara hanê ji bal Rêxistina Xwendevanên Kurd de di yekgirtinên Dewletên Emerîkî de dihate biderkevtin.

128Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
biderkevtin, ji yên ku ew di nava herdu ceng ên cîhanî de dihatin bikarhatin. Her Merovek, ji yên ku wan azar û destanên cengên cihanî ji xwe re dane bixwarin, dikarin pir bi başî ve di hilgirtina azar û destanên welatê me de û di kişandina derd û janên miletê me de bêtin biliberkevtin.

Hêjîbêtir ku ceng bi serê xwe ve bi malweranîkirinekê ve tête biderkevtin, miletê meyî aşîtîxwaz rû bi rû ve tûşî bi siyaseteke rehperestîyî çepel ve, bi pêrabûnên zordarîyî tolgirtî ve, bi serbirinên tevayî ve, bi talankirinê, barkirinê, derkirinê, şewitandina Bênderan, zeviyan û gundan ve, bi wêrankirina xanîyan ve bi ser Xwedanên wan ve ji Zarokan, Pîrekan û Piran ve, bi destdirêjkirinê ve li ser namûs û perestyan de têtin bikirin. Ez ji nû ve careke din banga xwe ji we. Hêjayan re didim bikirin; jiber ku serdarîya Iraqê hêjê bi xurtir ve û bi çepelîtir ve di siyaseta xwe de li ser erdê sutandî de tête biçûyîn û bi dehan hezar ve ji Neşînvanên Kurd piştî şewitandina gundên wan û talankirina malên wan di vê dema dawî de dide biderkirin. Herwehajî jiber ku ev cenga hanê ji xwe re serûştîya qirkirinekê ji nû ve dide biwergirin û ji bona qirkirina miletê meyî Kurd tête bihewildan; piştî ku serdarîkirina diktatorîyî sipahî di nemankirina şureşa Kurd de nehate biserkevtin.

Ev hemû bi carekê ve derbarê miletê me de têtin bikirin; jiber ku ew bes û bi tenha ve dide bixwestin, ku ew li ser zimanê xwe de kel

û pora xwe û nasîna milîbûna xwe bide biparastin. Piranîya pirî ku miletê me ji xwe re dide bixwestin, ew ewtonomî ji xwe re di nava sînorên Komra Iraqê de dide bixwestin, ya ku ew di nava biryarên Encumena Yekgirtina Netewan de der barî mafeyên Netewan de di çarenûsa wan de tête biderkevtin.

Hemû zordarîyên, yên ku miletê me li ser destên Serdarên Iraqîyî Rehperest de pê têtin birûkirin, bi carekê ve bi dijî peymana Encumena Yekgirtina Netewan ve têtin biderkevtin û herwehajî pêrejî ew bi dijî bendên mafeyên Merov ve têtin biderkevtin; jiber ku hebûna jîyana her Kurdekî di her cihekî de li Kurdistanê de lijêr desthilatîyên Iraqî de di bin tirsê de tête biderkevtin.

Derd û azarên nehayî kişandî ji bal miletê Kurd de ji derd û azarên her miletekî din de bi bêtir ve li jêr tarîntirîn pêla kolonyalîyê de têtin biderkevtin. Herwehajî jiber ku ruwên Zordarên miletê Kurd

bi esmer ve têtin biderkevtin, ev bi tenê ve nayête bitêrkirin, ku nîşana Kolonyalîyê li ser wan de bide binayînîkirin. Siyaseta Rehperestî ji bal serdarîya Iraqî de bi beramberî miletê me ve ne bi kêmtir ve û bi hovtir ve ji siyaseta herdu serdarîyên di Jêrî Efriqa û Rodîsya de tête biderkevtin. Siyaseta serdariya Iraqê bi şêweyê xwe ve bi hovtir ve ji siyasta wan herdu serdarîyan de tête biderkevtin, hegerjî ku ew di rêxistina siyaseta xwe de bi kêmtir ve ji herduyên din de bête biderkevtin.

Ez pir bi hêvî ve têtim biderkevtin, ku dê Encumena Yekgirtina Netewan û Rêxistin û Endamên wêna biryaran û pêrabûnan bidin biwergirtin, yên ku dê ew pişta miletê meyî sitembar bidin bigirtin. Ev hêvîyên min li ser wan bîr û barîyên qencî hanê de têtin birawestandin, ji yên ku li ser wan de ev Rêxistina Navdewletî û hêjabûnên

Merovanîyê hatine biavakirin û yên ku ew ji bona hemû Endamên xwe ji bi cîanîna wan hêjabûnên Merovanîyê didin bibangkirin, herwehajî hêjîbêtir jiber ku Encumena Yekgirtina Netewan bi Şûngirîya Hevgirêdana Netewan ve tête biderkevtin, ya ku wê bi cîanîna mafeyên miletê Kurd ve di biryara xweyî taybetî de di pêvekirina Kurdistana jêrî de bi Iraqê ve di 16 çirya duwem de di sala 1925 de pê date bimerckirin, ji mafeyên ku em iro wan ji xwe re didin bixwestin.
Jiber wan hoyên jorî û herwehajî jiber ku miletê Kurd di Iraqê de milîbûnekê dide bipêkanîn, ya ku ew bi ziman, kelepor û pêkhatîyên ve tête bipêkhatin û herwehajî jiber ku ev cenga vêkevtîyî neha di nava kurdistana Iraqê de metirsîyekê li ser aşîtîyê de di nava Rojhilata Navînî de dide bipêkanîn, wetov gotina serdariya Iraqê ji bingehê xwe ve bi derew ve tête biderkevtin, gava ku ew dide bigotin, ku pirsa Kurd bi pirseke navxweyî ve tête biderkevtin. Ev derewa Iraqê ne bi kêmtir ve ji derewa Serdarên Rodîsya û Afirîqya Jêrî ve tête biderkevtin, ku siyaseta wanî Rehperestî bi pirseke navxweyî ve tête biderkevtin.
Bi navê xwe û herwehajî bi navê miletê xweyî sitemkêş ve ez ji bona Encumena Yekgirtina Netewan, Encumerıên wê û Endamên wêyî din didim bibangkirin, ku ew encumenekê ji bona lêgerandina rastîyan de li Kurdistanê de bide birêkirin, bi kêmanî ve mîna ku wê ew ji bona nava jimarekê ji heremên lihevkevtî ve dayite birêkirin.
130Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Ez ji we didim bihêvîkirin, ku hûn sipasî û hêjabûnên min ji xwe re bidin biwergirtin
Dilsozê we
Mustefa Barzanî
Serokê Civata Rêberiya Şureşê di Kurdistana iraqê de û Serokê Partîya

Demokratî Kurdistan
"1966 .1 .1
Di nava rêz û dirên vê bi bîrxistana hanê ve tevaya nermbûna siyaseta diplomasîyî Barzanî û dûrbûn û kûrbûna wêna têtе biderkevtin. Ew li ser bingehekî pir bi bilind ve di warê diplomasîyê de dûr ji kînê û himjî ji dilbijandînê hatîya binivîsandin. Ew bi şêweyekî hişmendî rastîya rûdanên li Kurdistanê de li ser destên serdarîya Iraqî de li ber destên Encumena Yekgirtina Netewan, Encumenên wê û Endamên wê dide bidanîn ûji wan bi hemû nermbûn ve dide bihêvîkirin, ku ew pişta miletê Kurdî sitemkêş di nava welatê wîyî Kurdistan de li ser bingehên Bîr û bawerîyên xweyî bilind de bidin bigirtin. Wetov bi carekê ve siyaseta Barzanîyî pir bi bilind ve û li ser bingehê zanistîya siyasetê de têtе biderkevtin; jibervêjî ve tevaya Kurd û welatperwerên kurdistanê bi carekê ve pişta wê her û her didatin bigirtin û ew siyaseta hanê ji bal tevaya cîhana bajartî de rêz û piştgirtin jê re dihate bidîtin.
Xewin û nigaşên faşîya Erebî, keçel, kotî û sêwîyên Efleqî careke din jî bi vala ve hatin biderkevtin. Temenê serdarîkirina Arifê Yekem bi temenê pîvanokê ve hate biderkevtin. Ew di hilokepterekî de di 13. 4. 1966 hate bikevtin û hate bimirin, lê miletê Kurd Nevîyîn Midya, Pehlewanên Rojhilat bi ser bilindî ve li ber çavên tevaya dunyayê de li ser lat, teht û zinarên çiyayên Gotî de, di nava deşt û newalên kaşî, Orarto, Mîtanî, Subarto, Hûrî û Kardoxî de hatin bimayîn.
131
Hatina Arifê Duwem û girêdana peymana 29 axlêva sala 1966de"
Arifê Duwem ji bona serdarîkirina Iraqê hate bidanîn. Şer her û her bi

xurtî ve, bi gûr û germî ve tanî sala 1966 de li dar bû.
Piştî hêrîşa nuhî sipahê Iraqî ji bona ser Kurdistanê de "Barzanî bangek: ji bona bîr û bawerîya Cihanî û Dewletên Mezin de date biderxistin:
"Ji nêzîka pênc salan de serdarîya Begdadê cengeke dir û hov bi dijî gelê Kurdistana Iraqê ve dayit biberpakrin. Take hoyê vî şerê hanê bi dijî Kurd ve tête biderkevtin; jiber ku em daxwaza Ewtonomî ji bona Kurdistanê di nava çar çêwê Komara Iraqê de didin bixwestin.
Kurd hergîz daxwaza cêhêbûnê nadin bikirin û nejî dane bixwestin. Divê ev jî ber bi çavên serdarîya Iraqê ve bête bixistin, ku di 22. 12. Sala 1922 bi şêweyekî mîrî ve soz ji bona damezirandina ewtonomî date bidan; belam ne wê serdarîya hanê û nejî yên tevaya li dû wê hatî jî de rêz li wî sozî wergirtî de nedan bigirtin. Evaya jî zor bi
40Ji xwe re di vî warê hanê de li kovara Kurdica, July 1968 de bi zimanê Ingilizî ve
li vê gotara hanê de di bin nav û nîşana:" Two years after"; r.3- 7 bidin bitemaşekirin. Di vê gotara hanê de bi dûr û dirêjî ve hêjakirinek li ser pêla
derbasbûna du salan de li ser girêdana wê peymanê hanê de tête bikirin. Merov ji
xwe re ji vê gotara hanê pir sûd dide biwergirtin û bêtir li ser reweş û zîneta siyaseta
serdarîya Iraqê de beramber bi Kurd ve li Kurdistana Iraqê de tête bikirin.
Herwehajî di vê kanîya hanê de di rûpelê 9 - ı2 de gotareke pir bi nerx û hêja ve di bin nav û nîşana ~'The Kurd in 1968" -Kurd di sala 1968 de-, ji bal A. M.
Hamilton hatîye binivîsandin. Hemilton der salên çilî de rêya giradana Kurdistana

Iraqê bi Iranê ve date bivekirin, da ku Alîkarîya Hevalbendan di rêya kendava Farîsî
de ji Besra ji bona Sovyêtê di Qefqasya de bi dijî Elmanya ve bête bigihandin. Ev
rêya hanê bi navê wî jî ve taniha tête binavkirin, ku jêre rêya Hemelton tête bigotin.
Herwehajî wî nivîsteke pir bi nerx ve li ser Kurdistanê de li jêr navûnîşana .Road
through Kurdistan" - Rê di nava Kurdistanê re_,(2nd
•ed.), London 1958 de date
binvîsandin. Wî pir ji Kurdan didate bihizkirin, j ibervêjî ve pir bi başî ve tête biditin,
ku ev gotara vî kamasê Ingilizî bête bixwendin.
132Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
çakî ve niyaza bedî serdarîyên Iraqî yek li dû ya din de dide biderkirin, ku hemû ji bona çareserkirina pirsa rewayî Kurd pena xwe ji bona ber çek û bi karanîna hêzê ve dane bibirin.
Rojnamên cihanî û dam û destgehên cihanî jî çend caran tawankirina kuştina xelkê bi komel ve ji bona pal serdarîya Begdadê de dane bixistin, yên ku wê bi dijî gelê Kurd ve dane bikirin. Lêbelê serdarîyê tanî êsta hîç guhê xwe bi van tawankaran ve nedaye birapelkirin. Li ser rayê vê jî de ev serdarîya hanê di hêrîşa xweyî nuhî sipahî de her li ser bi karanîna napalm û bombên gazê jehrî de tête biçûyîn. Kurdistan neha tête biwêrankirin û xelkên wê têtin binabûdkirin.
Jibervêjî ve ez daxwaza yarmetîya sincî û merovanî li hemû gelên cîhanê de ji bona xelkê Kurdistanê de didim bikirin, yên ku ew xwe di nava metirsîyeke gewre de didin bidîtin.

Herwehajî ez daxwazê li hemû serdarîyan de didim bikirin û bi şêweyekî tabetî jî ve ez li dewletê mezinî cîhanê jî de didim bikirin, ku ew tev de ji bona serdarîya Begdadê de bidin bixwestin, ku heger ew divê li ser şer de bête biçûyîn, divê ew rêzê li peymana cihanîyî Cinêfê de bide bigirtin û heger ku ew bi servajîvêjî ve aşîtîyê dide bixwestin, ku em zor bi dilsozî jî ve daxwaza wê didin bikirin, bi pêwist ve tête biderkevtin, ku ew bi çareserkirina pirsa Kurd ve bête birûniştin, ya ku ew li gel canê serdemê de û li gel peymana Yekgirtîyên Netewan de tête biderkevtin.
Kurdista Iraqê, di gulnana sala 1966 de.
Mustefa Barzanî."
erên Zozik û Henderîn de di 3. 5. Sala 1966 de date bidestpêkirin. Di hêrîa Pêmerge de di 12/13 hestîyên textikê pişta leşkerê Iraqê hate bişikenadin. Bi sedan ve leşkerê Iraqî kelexên bê xwedî li dû xwe de li ser rasta ceng û şer de li Kurdistanê de datin bihiştin û ew ji rasta şer datin bipengizandin û bebizandin. Lingo bi qurbanû, durjumê Etleqîyan bû. Ew pir bi beramberî Zarok, Pîrek û Pîran ve, bi beramberî miletê bê çek ve pir bi çavsor û mêrxas ve têtin biderkevtin, lêbelê ew bi barmberî Pêşmegre û Zarokên Musa ve bi Dizên şekalên xwe ve têtin biderkevtin.
133
Şerên Zozik û Henderîn ji bal Pehlewan û Qehremanên Kurdistanê û Welatperwerên Ereb de bi dijî faşîya Efleqî ve hatin bikirin.
Ev erê hanê deh rojan date birêjkirin. Têde Girda Yekem û Duwem ji batirî Girdên sipahên Iraqî de ji koka pênc girdên wî di vî erê hanê de ligel bi hezaran ve ji Caan hatin bikarhatin. Amara serjimara vê koma ervanên Iraqî bi sîûpênc hezar ervan ve dihate

biderkevtin. Beramberî van bes ûbi tenha ve nêzîka sê hezar û nîv Pêmerge dihatin biderkevtin.
Armanca vê hêrîa hanê girtina serên çiyayên Henderîn û Zozikî beramberî hev dihate biderkevtin.
Pêmerge hêria xwe ji nikê ve û pir bi xurt û no ve di 12/13. 5.
1966de date bidestpêkirin û sipah ji cih û serıgerên wî date biderxistin. Tirs û lerz di nava sipah de hate bivêkevtin û canê bez û revê di nava wê de hate bizalkirin. Sipahê iraqê ji mêrxasî ve hate bikevtin. Kes bi kes ve tanî bajarê Rewanduz nema dihate biragirtin. Bi sedan ve hatin bi dîlkirin û bi sedan ve hatin bikutin û yên mayî jî hatin bitar û bimarkirin. Du ji xurtirîn Girdên Bi destkevtinên vî erê hanê tevaya gewrebûna ikestina sipahê Iraqî dide biderxistin. Em bes ji bona nimûne hinekan ji van bidestkevtinên hanê li vêderê de didin bitomarkirin:
6topên giran endaze75 mm, 4 topên giranî cihgirtîyi nelivandî, 4 xumpareyên giran endazî 4, 8 xumpamen endaz 3, 4 topên giran endaze 81 mm, 5 rêjinkên giran ji rengên Vîkerz, 2000 ji tiving, tivingên awtomatîkî, rêjînkên destî û exwer, 46 destgehên bêtêlî ji bona wergirtin û nardinê, bi ton an ve ji sindoqên teqemenî û bomban,
6000betanî. û herwehajî 100 çadimên sipahîyên gewre û biçûk ji bal Pêmerge ve hatin bidestkevtin. Hêjibêtir bi destgeh û titên pirî din jî bi dest ve hatin bikevtin, pir bi dijwar ve dikarîbûn bihatana bijimartin û biamarkirin. Herwehajî pir jitonên xwarin û vexwarinê ji bidest ve hatin bikevtin. Herwehajî di vî erê hanê du jixurtirîn û batirîn Girdên sipahê Iraqî hatin bitar û bimarkirin 41.
41Ji xwe re bi dûr û dirêjî ve li nivîsta Circis Fethula: Serdanek ji bona mêja nêzîk
de, r. 143 de bidin bi temaekirin.

134Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Faxir di Kongirê hetehemîn de di Navpirdan de di tîrmeha sala 1970de ji min re li ser tevaya bi rêveçûna şerên Zozik û Henderîn ve bi dûr û dirêjî ve date biaxivtin.
Mulazim Xidir min pir navê wî dabû bibihistin, jiber ku Barzanî û Pêşmerge jê didatin bihizkirin. Der salên heştêyî de min ew li Rajan de date binaskirin û Dostanîyeke pir xurt di navbera min û wî de hate bidîtin; jiber ew bi dil û can ve bi Dostê miletê Kurd ve dihate biderkevtin; jiber ku ew' bi Welatperekî Erebî mezin ve dihate biderkevtin û mina her Merovekî Welatperwer di vê dunyayê de ji miletê xwe pir didate bihizkirin; jiber vêjî ve û bi şiyarbûn ve wî ji miletê Kurd didate bihizkirin. Mulazim Xidir di vî warê hanê de bi tenha xwe ne bû. Bes û bi tenha ve ji bona nimûne ez dixwazim pir bi lez ve çend navan li vir de bidim bianîn: Ezîz Şerîf, Cewahirî, Hesen El Neqîb, Mulazim Ehmed û gelekî gelekî din jî dihatin biderkevtin, ji yên ku ew bi rast û durust ve bi durujmê Dostanîya Ereb û kurd ve didin bibawerîkirin û heger çarekirina pirsa Kurd li Iraqê de bi destên wan ve bihata biderkevtin, dê wan bi nimûnetî ve pirsa Kurd li Kurdistana Iraqê de him ji bona Qazanca miletê xweyî Erebî û himjî ji bona Qazanca miletê Kurd bidana biçarekirin, da ku herdu miletên Dost li ser bingehê mafeyê çarenûsê de ligel hevdû de bihatana bijîyandin û bi xweşî û bextiyarî ve bihatana bijîyandin û dewlemendiya welêt ji bona avakirina wîna bihata bikaranîn û ne di encamê dawî de mîna ku Basiyan date bikirin, ku ew dewlemendîya hanê ji bona dujminatîya Ereb û Kurd û di wêrankirina Kurdistan û Iraqê de dihate bikaranîn, da ku dewleta Iraqê di encamê dawî de bi darê zorê ve, li ser serpêhatîyên miletan de û hêjîbêtir bi hinera qanûnên jînê ve mîna Selteneta Osmanî û dewletên dinî bedkarên

mîna wê ji hev bête bixistin û ji nefet û ava Kurdistanê bête bibêpişkirin û Kurdistan bi serxwebûna xwe ve bête bitacûxelatkirin.
Rojekê ji Rojan de miletê Kurd di seranserî mêjûwa xweyî dirêj de şer ne ligel Birayên Xweyî Ereb, nejî ligel Birayên xweyî Turk û nejî ligel Birayên xwyî Faris de dane bikirin. Wan her û her durujmê biratîyê ligel wan miletên hanê de dayite biberz tl bibalakirin. Wan her û her li ber man û nemana xwe de bi dijî Serdarên Dagirkerên Rom, Ereb û Ecem dayite bidan û bi mêrxasî û qehremanî ve bi dijî wan ve wî ji

bona rizgarîkirina Kurdistana xwe ji nava lep û pencên wan dayite bitêkoşînkirin û şerkirin.
Her û her li Kurdistana Irqê de durujmê biratîya Kurd û Ereb ji bal Dilsoz û Welatperwerên Kurd de hatîye biberz û bibalakirin.
Barzanî Rêberê Miletê Kurd der sala 1943 de di daxuyanîya xwe de ji bona miletê Kurd û Ereb de dide bigotin: "Em şer ligel miletê Ereb de nakin; ji ber ku ew bi birayê me ye, lêbele bes û bi tenha ve em şer bi dijî Serdarên wî ve didin bikirin, yên ku ew bi rast û durustî ve bi Nokerên impiryalizma Ingilizî ve têtin biderkevtin."
Bi vê rastîya hanê ve Rêberîya Kurd di bin serokitîya Barzanî de her û her di seranserî xebata gelê me de di bin hemû merc û zînetên tirş û talî hovberî de ji bal Rehperestên Erb de Kurd pê dane biperwerdekirin û Barzanî rojekê ji rojan jî tucarî cudabûnek ji bona nava xebata miletê Ereb û Kurd nedayite bixistin.
Her û her evîndariya wî ji bona Xebatvanên Ereb û hijakirin û rezlêgirtina wina ji bona wan dihate bibêtirkirin. Wetov Pêşmergên Kurdistanê û Welatperwerên Kurd ji bal Rêberê mezinî Barzanî de bi evîndariya miletan ve û ji bona xebata wanî rizgarîkirinê dihatin biperwerdekirin; jibervêjî ve û bi saya serê Barzanîyê Qehremanê

miletê Kurd ve tucarî di nava Pêşmergên Kurdistanê de kîndarî beramberî miletê Ereb nedihate bidîtin; jiber ku wî ew her û her bi rast û durust ve bi birayên wan ve didatin bidanîn.
Wehajî Komela me jî, Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de li ser vî rêbazî Barzanîyê rast û durustî mêjûyî de di tevaya siyaset û ragiyandina xwe de ji bona bîr û bawerîya cîhanî de li ser xebata miletê Kurd de di seranserî Kurdistanê de dihate biçûyîn. Wê her û her durujmê dostanîyê û biratîyê ligel miletên Ereb, Turk û Faris de û herwehajî ligel tevaya miletên din de di seranserî cihanê de didate bibilindkirin û wê Endamên xwe pê didatin biperwerdekirin.
Jibervêyekê jî ve Komela me di tevaya siyaseta xwe de durujmê Dostanîyê, Biratîyê û Aşîtiya di nava hemû miletan de didate bibilindkirin û wê ew bi bendekê ve ji pênc bendên bingehî ve di nava destûra xwe de dabû bidanin; jiber Endamên Komela me, Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de xwe bi Pêşmergên şûreşê ve li jêr Reberîya Barzanî de li derveyî welêt de didatin bidanîn, ku kar û barên wan di şiyakirin û ragiyandin tevaya bîr û bawerîya cîhanî de him li

ser zînet û rewşên Kurdistana Iraqê de û himjî li ser û rewş zînetan de di seranserî Kurdistanê de dihatin bidîtin. Çekên me bi dilsozîya me ve li ser rêbazê Ahmedê Xanî û Barzanî ve ji bona serxwebûna Kurdistana me dihate biderkevtin, çekên me bi xame û bi pênivîsên me ve dihatin biderkevtin û hêjêjibêtir çekên me di zanebûn û zanistîya me de dihate biderkevtin. Jîrîtî, zanebûn û zanistîya Ewropî bi armanca me ve ji bona rizgarîkirina Kurdistan me ve, ji bona serxwebûna welatê me ve û ji bona bi pêşvexistin û geşkirina civaka Kurdistana me ve dihate biderkevtin. Her Endamek ji Endamên Komela me xwe bi peyamberê miletê xwe ve ji bona gihandina dengê

wî, derdên wî, awatên wî û hêviyên ji bona tevaya bîr û bawerîya cîhanê didate biderxistin û wetov ji wî pê didate bihestyarîkirin.
Arifê Duwem piştî şikestina leşkerê wî di Zozik û Henderîn de bi rewestandin şer ve û bi pêkhatîna peymana 29 axlêva sala 1966 ve hate bineçarîkirin. Di vê peymana hanê de rêjima Arifê Duwem bi hin daxwazên Kurd ve hate bipêrûniştin, ku di wê çaxê de Bezaz bi Serokê Wezîran ve dihate biderkevtin. Arifê Duwem ligel Bezaz de ne didate bixwestin, ku ew pirsa Kurd bidin biçarekirin, lêbelê wan didatin bixwestin, ku ew belkî bi aşîtî ve şûreşa Kurd ji hevdû bidin bixistin û Kurdan xwe bi xwe ve bi bera hedû ve bidin bikirin û wan di nava xwîna wan de bidin bivegevizandin û agirê cengeke navxweyî di nava kurdistanê de di rêya Caşên Şêtûşeş de bidin bilidarxistin.
Ev siyaseta hanê pir ji kevnarî de, ji roja pêkhatîna dewletên bajaran de ji pêla Somerî de, her û her Serdaran bi dijî meletên jêrdestên xwe ve didatin bikaranîn; jiber ku ew siyaseta hanê him pir bi arzan ve û himjî pir bi kêr ve dihate biderkevtin. Heger kurmê darê ne ji darê ve bête biderkevtin, dar nayête bikurmkirin. Dujminên me di tevaya dirêjbûna serdarîkirina xwe de di nava Kurdistana me de ev siyaseta hanê hergav ji xwe re didane bikaranîn û wan em pê di nava xwîna me de didane bivegevizandin. Wan her û her bi destên hêzên lawza ve didatin bigirtin û hêzên xurt pê didatin bişekinandin û di pişt re wan pêhnek li wan hêzên lawaz de didin bixistin û ew jî ji ber xwe didatin bihilanîn.
Di pêla serdarîya Şahînşahîya Iranî û Selteneta Osmanî de li ser Kurdistanê de û herwehajî di piştî parvekirina Kurdistanê de li ser bingehên peymana Sayks-Piko de û perçekirina wêna ji nû ve di
l37
navbera Dewletên Turkî, Iran, Iraq û Surî de ew siyaseta hanê hergav

hêjî tête bikaranîn. Ev siyaseta hanê ji bal Mikavilî de di nivîsta Mîr de di bin nav û nîsana: "bi parvekirin û bizalkirin ve" dihate binaskirin.
Ingilîz di tevaya dirêjbûna desthilatiya xwe de di nava Koloniyên xwe de di seranserî dunyayê de beramberî miletên jêrdestên xwe de her û her ew didate bikaranîn û ew têde bigir hergavjî bi serkevtî ve dihate biderkevtin.
Bezaz jî bi nala Nokerekî rasteqîneyî Ingilîz ve ji xwe re date bixwestin, ku ew vê siyaseta hanê mîna hercar li Kurdistanê de bide bicîanîn. Belê Bezaz bi vê siyata xweyî çewt û xwar ve tanî demekê hate biserkevtin. Kurd pê pir hatin biêşandin. Herwehajî Komela me jî bi vê siyaseta hanê pir pê hate biêşandin. Belê vê siyaseta Bazazî çewt û xwar Çaşên Şêst û Şeş di sala 1966 de date bidurustkirin û biafirandin, yên ku ew der sala ı964 de bi handan û fermana Sevakê Iranî ve bi dijî Barzanî û Şureşê ve ji bona bi ser tapanan ve hatin bikirin. Ew ji nava şûreşê di rêya Hemedanê re ji bona Iranê hatin biderkevtin. Ew bi tevaya gemara xwe ve ji bona Şahê Iranê hatin binardin. Di pişt re Barzanî li wan de hate bibuhurandin û ew ji bona nava şureşê hatin bivegerandin. Gava ku Bezaz ji wan destên xwe datin bidirêjkirin, ji nû ve bi lez û bez ve ew ji bona nik sedarîya Iraqê hatin biçûyîn, da ku ew Çaşîtîya xwe û bêbextîya welatî ji bona Serdarîya Iraqê bi dijî şureşê û berjewendîyên Kurd û Kurdistanê bi nokerî ve bidin bikirin. Van Caş û Nexweşên zarotîyê xwe bi Caşîtî û bêbextîya welatî ve, bi nokerî û hestîkojîya xwe ve li ser sifra Dujminên me de bi pêşvrû ve didatin biderxistin û wan Barzanî û tevaya Peşmergên şureşê bi xwe jî ve bi kevneperest ve û bi dijî Kurd ve didatin bidanîn; jibervêjî ve wan xwe bi Caşpolîsên serdarîyê dabûn bikirin û rûxandina şureşê bi ser milên xwe ve ji bona serdariya

şovînîyî Erebîyî Iraqî dabûn bihildan
Lêbelê ne wê siyaseta hanê û nejî wan Çaşên Şêst û Şeş jî dikarîbûn xwe li ber pêşveçûna şûreşê û xebata miletê Kurd de di bin Rêberaya Barzanîyi Qehremanê miletê me de bidana bigirtin. Ev siyaseta hanê û Çaşên Şêst û Şeş her û her di nava seranserî Kurdistanê de dihatin birûreşkirin û bikevtin û Çaşên Şêst û Şeş jî
138Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
bibêbextiya welatî ve hatibûn bikevtin û binavkirin. Ji alîyê din jî de şûreş û xebata miletê Kurd her û her dihate bipêşvekevtin û biserkevtin.
Di navbera 15-20. 11. 1966 de Kongirê Heftemî Partîya Demokratô Kurdistan di Gelale de hate bigirêdan. Di vî Kongirê hanê de:
Xurtbûn û yekîtîya Partîya Demokratî Kurdistan û desthilatîya wê di nava Cemawerên kurdistanêyî fireh de hate biderkevtin:
Têgihiştina wêyê kûr ji bona rewşên wê demê de, nîşankirina rêya xebata partî û miletê Kurd çi warê hundurû de û çijî di warê navdewletî de hate biderkevtin û herwehajî têde Çeteyên Ibrahîm Ehmed - Celal Talebanî- bi Xinêzîya -Xiyaneta- mezin ve beramber bi milet û welêt ve hatin bitawankarîkirin.
Têde li ser Peymana 29 axlêva 1966 de hate birûniştin û Kongire ji serdarîyê bi cînanîna wê peymana hanê ve him bi canê wê ve û himjî bi navroka wê ve date bidaxwazîkirin.
Têde bi tevaya dengdanê ve careke din Mustefa Barzanî ji bona Serokê Partî hate bihekbijartin.
Gotina rêkirî ji bal Serok û Serdarê Şureşê Mustefa Barzanî de ji bona vekirina Kongirê Heftem de:
"Mêvanên hêja!

Birayên Endamên Kongirê Heftemî Partî!
Silav ji bona we, dilovanî û pîrozbaya Xwedê ji bona we
Min pir didate bixwestin, ku ez di vî Kongirê weyî hanê de bihatama biamadekirin, lêbelê ji ber rewşa minî tendurustî de li ser min de date bineçarîkirin, mîna ku hûn didin bizanîn; jibervêjî ve min ji bona birayê Hebîb date bisipartin, ku ew ji dêlava min ve vê gotina hanê ji we re bide bixwendin."
"Birayên hêja!
Ji we nayête biveşartin, ku pêşkevtin û bextiyarîya netewan li ser xebata Zaroyên wanî dilsoz de têtin birawestandin, ya ku ew bi gorîvanî ve ji bona bicîanîna aramanc û nimûneyên bilindîyî wan

milet û netewan de didin bikirin. Li ser vî bingehê hanê de ez ji we didim bihêvîkirin, ku hûn derd û dijwarîyên miletê meyî Kurd û şûreşa wîyî dadwer bidin bixwendekarîkirin, da ku hûn ji bona wan çarekirinên rast û durust bidin bidanîn û herwehajî da ku hûn wan Merovan ji xwe re bidin bihelbijartin, ji yên ku hûn dilsozîyê û karînê di wan de didin bidîtin, ji yên ku ew dê bikaribin kar û barên Partî bidin biserpereştîkirin.
Herwehajî pêrejî ez ji bona kongirê we tevaya bi serkevtinê ve ji bona kara armancên miletê meyî Iraqî bi giştî ve û miletê Kurd bi taybetî ve didim bihêvîkirin.
Ez ji we ji ber rewşên xweyî tendurustîyê û kar û barên xweyî pın din hêvîya lêbuhurandinê didim bihêvîkirin, ku hûn xwevekişandina min ji Serokitîya Partî bidin biwergirtin, heger ku ev bikare bête bikirin; jiber ku min di berê jî de ji bona we ev hêvîya hanê di Kongirên dinî Partî de didate bipêşkeşkirin. Dê ezê her û her ji bona wî Merovê ji bal we de helbijartî bi hemû karînên xwe ve bi

alîkar û piştgirt ve bêtim biderkevtin, da ku em bi hev re erkên li ser şanên me de bidin bikirin.
Di dawîya dawî de em ji Xwedawendê Bilind ve didin bidaxwazîkirin, ku ew me tevan ji bona ser wê rêyê de bide birêberîkirin, ya ku têde qencî û çakîya milet û welat têtin biderkevtin.
Silav ji bona tevan.
Birayê weyî dilsoz
Mustefa Barzanî
Di 14. 11. 1966 de"
Herwehajî Barzanî di dawîbûna vî Kongirê hanê de ev nameya hanên jêre date biarastkirîn û Kongire pê hate bidawîkirin:
"Birayên Endamên Kongirê Heftemî Partî!
Silav ji bona we, dilovanî û pîrozbaya Xwedê ji bona we
Ez dê pir ji pêşîya pêşî de bi kêfxweş ve bihatama biderkevtin, heger ku min bikariba kongirê we bida bivekirin û di nava kar û barên wî de bihatama bibeşdarîkirin; belam jiber rewşa minî tendurustî de, mîna ku min ji we re di berê de dabû bibîrxistin, mexabin ez nikarîbû di nava kongirê we de bêtin bibeşdarîkirin. Herwehaj di vê rojê jî de

min careke din date bihewildan, ku ez di vê civîna dawîyî kongirê de bêtin biamedebûn, da ku ez kar û barên wê û herwehajî xebata weyî dilsoz bidim bipîrozkirin, ji yên ku ew ji bona kara Partî û miletê didin biarmanckirin. Careke din jî ev xwezîya hanê jiber hoyên berê de nikarîbû bihata bicîhatin.
Di dawîya dawî de ez ji bona we biserkevtinê didim bihêvîkirin û ez ji we didim bihêvîkirin, ku hûn silavên min û hêjabûnên min ji bona birayên xweyî dilsoz di nava heremên xwe de bidin bigihandin. Ez we sipasdikim.

Dilsoz
Birayê we Mustefa Barzanî
.42,,1966 .11 .18
Barzanî bi bîrxistineke pir bi nerx û hêja ve di bin nav û nîşana: .Bîrxistinek ji Barzanî ji bona Serdarîya Iraqê" de date birêkirin û wetov ev bi bîrxistina hanê ve hatîye binivîsandin. Jiber girgbûna wêna ve û himjî ji bona bêtir xwendevanên hêja li ser wê pêla mêjûyî de di mêjûwa xebata me de bêtir bêtin biliberkevtin, ez dixwazim wê bi bîrxistina hanê ve ji zimanê Erebî bidim biwergerandin û wê li vê derê de bidim bitomarkirin:
i,Serwerê Serokê Komara Iraqê Sergird Abdul-Rehman Mihamed Arifê hêja
Serwerê Serokê Wizaretê Serleşkerê Cengoş Nacî Talibê Hêja
Silavek Xweş
Em ji bona serwerîya we vê bi bîrxistina hanê ve didin bibilindkirin, da ku em bêtir ronahîyê ji bona ser zîneta nehayî sarkirî de bidin biavêtin, ya ku ew gift û gokirinê dide bipoşandin û ya ku ew kospan di rêya çarekirinkirina pirsa Kurd de ji 29 axlêvê û tanî neha de dide bixistin.
42Ev herdu gotinên Barzanîyî hanê ji rojnama Xebat bi zimanê Erebî ve di jimara
493de sala ı966 de, r. ıhatine biwergirtin.
141
Ji Serwerîya we nayête biveşartin, ku peymana 29 axlêvê bi bendên xweyî belavkirî û ne belavkîri ve mafeyên miletê Kurdî milî di nava xwe de didin biwergirtin, ji yên ku miletê Kurd her û her ji bona wan didate bidaxwazîkirin û ew nehajî ji bona bicîanîna wan ve bi xurtî ve dide bidaxwazkirin, nemaze derd û janên wî ji bona wan

mafeyan bêtir ji dema cenga cihanî duwem de date bidirêjkirin. Lêbelê jiber ku me didate bixwestin, ku ji bona parastina berjewendîya bilindî welêt û ji bona nehiştina rijandanina xwîna birayên Ereb û Kurd û herwehajî ji bona parastina yekîtîya welêt em li ser peymanê de hatin bipêrûniştin. Me didate bihêvîkirin, ku dê bendên wê bi nêtek baş ve û bi canekî başîtî ve bêtin bicîanîn, ku têde dê bi kêmtirîn mafeyên miletê Kurd ve pê bête birûniştin. Lêbelê em vê didin bigotin û û cerg û hinav li me de têtin bisûtandin, ku peyman hêjî yanjî bigir bi belgeyekî mirî ve tête biderkevtin, tevî ku bêtir ji pênc mehan jî de di ser belavkirina wê re hatine biderbasbûn. Hêjîbêtir ZÎnet hate bitevlihevkevtin, gava ku hinekan ji Berpirsiyarên Serdarîyê bi hin gavan ve hatin birabûn, ku wan bêtir metirsî datin bibelavkirin û aramî ji binî de datin bipeqandin û pevçûn di nava heremê de datin bilidarxistin. Ev rastîya hanê di afirandina rengekî nuh ji Suwaran-Caşan. Cuma- tête bigewdekirin, herwehajî ew hatin biçekkirin û bipiştlêgirtin û ew ji nava serbazxanên serdarîyê de ji bona destdirêjîya li ser azadî û jîyana Neşînvanan de didin bihêrîşkirin. Ew rûdanên, yên ku ew li Sulêmaniyê, Pencewîn û Qeladizê de têtin bikirin, bi baştirîn Bînvanên zindî ve têtin biderkevtin.

Bi rastî ve û li ser yên çûyî de em dikarin bidin bigotin, ku şer bi carekê ve ji 29 axlêvê de nehatîye birawestandin û bi dehan ve di vê pêla hanê de Kuştî û Birîndar hatine bikevtin. Çûn li ser vê yeka hanê de dê zînetek pir bi tirs ve bête biafirandin; jiber ku şerkirin ligel hevdû de çend jî ew bi sivîkî jî ve bêtin biderkevtin, dibe ku ew ji bona encamên pir nebaş de bêtin bipêşvexistin. Ev bi xwe jî ve bi bê dilê Sozdarên vî welatê hanê ve têtin biderkevtin.

Ji rexekî din de hin ji Berpirsiyaran de pirsa Kurd bes û bi tenha ve di nava danava avakirina Jor de dane bixistin, ku jê jî tu tişt jî

nehatîye bicîanîn, tevî ku divabû ew pir guh ji bona pirsa Kurd de ji tevaya alîyên wê de pişti derbasbûna pênc salan ji derd û destanan de di ser wê re bidana bidan.

142Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

•

Ji rexekî sêyem de Berpirsiyarên Gewre dest bi berdana peyvan ve dane bikirin, ku ew têde bi navdûxistinên pir mezin û dûr ve ji rastîyê û rastê de didin bixistin, ji yên ku bes û bi tenha ve Xwedawendê Mezin dide bizanîn.

Em remanên xwe ji xakê welêt û ji canê biratîyê di nava Ereb û Kurd de didin biwergirtin û tu givaştin nikarin li ser me de bidin bikêrkirin, hegerjî kanîya wan ji kû derê jî de bête biderkevtin. Tête bizanîn, ku Xwefiroşên kevin û nuh û hin ji Berpirsiyaran de, ji yên ku ew li ser kîsê şerê di nava Biran de bi. nexweşîya ziktilêrîyê ve hatine bikevtin û ew bi rolek şermezarî ve di afirandina pevçûnan de, di peqendina bîr û bawerîyan ligel hevdû de û di nokirina pevçûnê de di nava pêwendîyan de didin biyarîkirin, da ku ew destanên berê bidin bivegerandin û da ku bêtir ji xwe re malê vî miletê xwegirtî û bêhnfireh bidin mijinadin. .

Bi rastî ve me gelek hêvîyên mezin li ser serdana Serokê Komarê ji bona Jor de û ditîna me ligel serwerîya wî de date bidanin. Me ew pir bi nêzîk ve li ser girêkan de date biagehdarîkirin. Neşînvanan wetov ji xwe re didatin bigûmankirin, ku Serwerîya Serok ligel xwe de kilîta vekirina girêka pirsa Kurd dayite bihilgirtin, gava ku wî berê xwe ji bona Jor de date bivekirin. Tevaya hêvî û awatên wan ber bi wê serdanîya hanê ve dihatin bikişandin û herwehajî bi wê serdanîya hanê ve tevaya dostên Iraqêyî dilsoz Rê dihatin bibextiyarîkirin. Tevî li hemû giringbûna wê serdanana hanê û

kêra wêyî baş jî de li ser hemû Neşînvanan jî de bi peroş ve wetov tête biderkevtin, ku hin destên wêrankirinê xwe di nava dam û destgehên hestyar û bilind de didin bihêlînkirin, yanjî ew xwe li dor û berên serdarîkirinê de didin bikomkirin, da ku ew nedin bihiştin, ew sozên wergirtî bêtin bicihanîn. Ew wan tiştan didin biherifandin, ji yên ku ew ji bal destên avanîkirinê de têtin biavakirin û hîç bi dilên wan ve nayêtin bikevtin, ku biratîya Ereb û Kurd bête bihîmkirin û yekîtîya welatî bête bixurtkirin. Ew bes û bi tenha ve dixwazin, ku welat careke din ji bona nava destana cenga navyweyî de bête bivegerandin. Ji vê pê ve tu têgihiştinên meyî din li ser hiştina vê zîneta bed de nayêtin biderkevtin.

Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku em li gora karînên xwe de bi hemû karekî ve di nava vê zîneta dagirtî de bi nobûnên xwe ve û pir

dûr ji bawerî, piştgirêdanê de ligel hevdû de û nebûna girawkirinan hatin birabûn û em bi van karên hanê ve hatin birabûn:

Me hemû Dîlvan bi carekê ve û di yek carê de dane biberdan.

Me hemû rêyên giştî dane bivekirin.

Me Istgeha xwe ji daweşandinê de date birawestandin.

Em bi vegerandina serpereştîyên cih ve li gora peymana rawestandina şer de pê hatin birûniştin.

Me piranîya çekên giranîyî serdarîyê ji bona Berpirsiyaran de date bizîvirandin.

Bi rastî ve em bi hemû karekî ve hatin birabûn, ji yê ku wî ji bona serûştîkirina zinetê di heremê de didate bikêrkirin.

Debera em ji xwe re li kar û barên kirî de ji bal serdarîyê de li gora peymanê wê de bi xwe jî ve bidin bitemaşekirin. Di pêşgotina wê de wetov hatîye binivîsandin: "ku ev serdarîya hanê dide bixwestin, ku

ew sînorekî ji bona vê rewşa ne serûştî de di tevaya hêlên Jorî Welêt de bide bidanin .... Ji bona dubarekirina li ser bestîyên rastî heyî de di navbera Ereb û Kurd de, yên ku ew ji bona karekî dilsoz û hestyar de ji bona qencîya welatê hevbeş de didin bibangkirin, em vî bernameya hanê didin bidazanîn û herweha jî em pêgîrîya xwe pê bi carekê ve didin biderxistin, ku dê em wê bi navroka wê û canê wê ve bi leztirîn dem ve li gora karînê de bidin bicîanîn."

Em pir bi başî ve didin bidîtin, ku em vê peymana hanê bend bi bend ve li gora rêza wan de li ser de bidin biaxivtin:

Rewş û zînetên ji rêderketîyî heyî de ji bona piranîya Serdaran de bi dilên wan ve têtin biderkevtin û desteyek ji yên tundrû ji wan de daxwaza vegerandina pêkanîna Civata Rêberîberîya Şûreşêyî avêtî didin bixwestin, ango ew ji bona çesipandina zînetên ji rêderkevtî de didin bikarkirin, ji yên ku jê milet di nava salên çûyî de pir tirs û talîj i xwe re dane bixwarin. Herwehajî ev tevde ji bona danîna destûra hergavî û yasayîkirina wê de didin bidûrkirin, ya ku têde divabû "li ser mafeyên milîyî Kurd de bihata bidubarekirin û ew bi bêtir ve bihatana bieşkerekirin, ku bi diyar ve bi pêrûniştina milîbûna Kurd ve û bi mafeyên Kurdî milî ve di nava welatê Iraqêyî yek de bihata bikirin, ku welatê Iraqê du milîbûnên serokî ji Ereb û Kurd di nava xwe de dide

Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

biwergirtin, ku têde Ereb û Kurd bi wekhev ve bi xwedanê mafeyan û erkan ve têtin biderkevtin."

Qanûna Parêzgehan hêjî ji xwe re ronahî nedaye bidîtin, tevîjî ku di peymanê jî de hatîye binivîsandin, "ku ew xwe di rêya qanûnkirina xwe de dide bidîtin". Tevjî ku ew ji bendên bingehî ve tête biderkevtin, ji yên ku ew di nivîsandina sipartina Nacî Talib ji bona pêkanîna Wezaretê ji bal wî de têtin biderkevtin. Wetov ji bona

Nacî Talib pê hate bisipartin, ku ew Rêstika Nenawendî bide bicîanîn û beşdarîkirina Neşînvanan di kar û barên wanî cihî de û şehrebanîyê de bi yasayekî ve bide biderxsitin û divê wê qanûnê hanê jî bide bicîanîn. Ango pêrabûna Kurd bi beşekî mezin ve ji mafeyên xwe ve, ji yên ku serdarîyê di peymana xwe de bi wan ve hatîye bipêrûniştin, bi derkirina qanûna Parêzgehan ve tête bigirêdan, ya ku Berpirsiyarên Gewre di nava dewletê de xwe pê didin bidiyarkirin, ku ew dixwazên dev ji derkirina wê qanûna hanê de bidin biberdan.

Pêrûniştina serdariya bi zimanê kurdî ve bi nala zimanê mîrîyî xwendinê ve di nava heremên, ji yên ku têde piranîya Neşînvanên wan ji Kurd têtin biderkevtin, hêjî pesindana qanûnî jê re nehatîye bidan. Wetov bi vî corê hanê ve hîç tu pêt jêre ji alîyê bicîanîna wê qanûna hanê de pê nehatîye bidan.

Heger ku bi rastî ve nêta bi pêrabûna helbijartinê ve di nava sinorên demî de bête biderkevtin, ji yên ku destûra demî jêre dayite bidan û ji yê ku milet pir daxwaza wê helbijartina hanê jî dide bikirin; jiber ku dê ew helbijartina hanê mafeyê wîyî rewa di serdarîkirina xwe de jêre bide bive gerandin. "Em didin bigotin, heger ku nêt bi rastî ve ji bona wê yeka hanê de tête biderkevtin, bi başî û qencî ve tête biderkevtin, ku jê re amadebûn bi berdana azadîkirina giştî ve mîna azadîya rojnamevanîyê, azadîya rêxistinê û yên din bête bikirin, da ku helbijartin bi rengekî serûştî ve bêtin bikirin. Belam heger ku her tişt bi mîna xwe ve hate bimayîn, dê wê çaxê bawerîya Neşînvanan bi pêrabûnêrı helbijartinê ve di dema wê de bêtin bigizkirin". Dê ev jî bêtir li bêtir dûrbûnê di navbera milet û Serdaran ,de bide bixistin., ku dê ev jî hêjîbêtir û bêtir dujminatîyê bide bidurustkirin û bawerîyê bi ayind ve bide bikêmkirin.

Li pêşîya Kurd de ber ji bona beşdarîkirina wan ligel birayên

.xweyî Ereb de di karmendîyên gişтî de û têde jî di nava wezaretan de û 145
di nava karmerıdîyên serpereştîyî gişтî de, herwehajî di nava karmendîyên serpereştîyi dadgehan, diplomasî û sipahî de ne li gora endazîya amara serjimara wan de û nejî hêjî bi erıdazîyeke pir kêmji ve bigir hatîye bivekirin. .Herwehajî ji biçûktirîn karmend, ji yên ku ew ji ber hoyên pirsa Kurd de hatin biderkerin, ji bona ser karmendiya xwe nehatin bivegerandin, herwehajî bi hîç corekî ve tu kes ji bona ser karmendîyên xweyî hestyar nehatin bivegerandin". Herwehajî tête biderkevtin, ku di listên Wergirtvanan de di kolêca Sipahî, Balafiran, Polîsan de ji bona vê sala hanê de bes û bi tenha ve endazîyeke pir kêm ji Kurd têde têtin biderkevtin. Hîç Xwendevanek ji bona nava van kolêcan de nehate biwergirtin, ji yên ku pêwendiyên wan ligel şûrêşê de dihatin bidîtin. Magelo dê çawan di ayinde de wekhevbûn ji bona Kurd bête biderkevtin?
Hîç zanistgeha Begdadê bêtir tu pêtkirin bi zimanê Kurdî û kel û pora wîyî remanî û şehristanî ve bi mûyekî ve nedaye bidan û herwehajî ew wetov tête bidiyarkirin, ku tu guhpêdana wêrıa ji bona vekirina şaxekî xwe li Jor de nayête biderkevtin. Herwehajî beramber bi Xwendevanan ve, ji yên ku ew ji xwendina xwe ji ber hoyên dildarîya wan de ji bona pirsa miletê xwe de hatine bidûrkirin, qanûnên Perwerdekirinê li ser wan de hatin bicihatin, ji yên ku ew bes û bi tenha ve ligel zînetên sadetî ve dihatin bicihatin; jibervêjî ve pir ji wan Xwendevanan ji bona vegerandina xwendina xwe hatin bibêpişkirin. Hêjî piranîya pir ji Karmendên serpereştîyê, ji Dadvanan, ji Rêvebirên Polis, Asayişê û yên din ne ji Kurd di nava Parêzgeh, Melbend û Navçeyên Kurd de têtin bimayîn.
Hêjî tu ber li ber rojnamevaniya siyasî û wêjeyî Kurdî de di derkevtinê

û geşkirinê de nehatîye bidan, di dema ku ev bi servajî ve li nik rojnamevaniya Erebî de tête biderkevtin.
Qanûna libuhurandinê ligel veguhertinên xwe de bi kêm ve tête biderkevtin û ew bi bend ve tête biderkevtin; jiber ku ew endazîyeke kêm ji Beşdaran "di rûdanên Jor de" bi ber xwe ve dide bixistin. Hêjî bi sedan ve ji Girtîvanan û Tawanbarkiryan de bi hoyên beşdarîkirina wan ve di rûdanên Jorî de têtin bidîtin, ji yên ku ew hêjî nehatine biberdan. Herwehajî tu dadwerî beramberî wan Karmendan û Rûnişvanan nehatiye bikirin, ji yên ku pêwendiyên wan ligel şür.eş.ê.de ne di vê qanûna hanê de û herwehajî ne di qanûna dadwerıkırına
146Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Karmendan de dihatin bidîtin. Hiç rê ji bona wan Karmendan, Kargeran û Bikargirtîyên Kurdîyî derkirî ji bona vegerandina ser karmendî û karên xwe ve nehate bidan. Ew pir di nava perişanîyê û rebenîyê de têtin bijîyandin; jiber ku dema derkirina wan pir hate bidirêjîkirin. Bi diyartirîn nimû ve li ser vê yeka hanê de bi nimûna Kargerên nefta Kerkukê ve tête biderkevtin.
Ne bicîanîna serdarîyê bi erkên wergirtîyî ji bona ser xwe ve ji alîyekî de û afirandina wêna ji Suwaran bi "şêweyekî nuh" ve û veguhertina wan ji bona deshilatîyeke duwem de, da ku ew xelkê bidin bizindanîkirin, bidin bidadkirin û bidin bidarvekirin, ji alîyê din de serdarî xwarin û vexwarîna beşekî Pêşmerge nade bidan, ji yên ku wê xwarin û vexwarina wan ji bona ser milên xwe ve dabû bihilgirtin, Herwehajî wê ji rexê sêyem de tu bawerî li nik Pêşmerge de nedate biafirandin, ji yên ku ew berê di nava sipah û polîs de bûn, da ku ew ji bona ser karmendîya xwe bêtin bivegerandin. Herwehajî pêrabûnên serdarî bi serên me ve nedatin bixistin, ku em navtêdanê ji bona vegerandina wan bidin bikirin.

Li gora benda yanzdehan de ji peymanê de divabû
Assembly, the service of the Government and in the adminstration of the Govmment. The Kurdish languege, however, may be taught in the school and
the Govemment may encourage its use provided that this shall not be made the
basis of any future demand for the recognition of the Kurdish language as the
official language of the gernment.

.16The primary duty of the Kurdish National Assembly shall be to found a
university with law and medical faculty.

.17No tax whatever may be imposed by the Kurdish National Assembly without the
approval of the Governor-General and before the Great National Assernbly of
Angora shall be informed.

.18No concessions of any kind shall be granted with out first consu\ting the Great
National Assembly of Angora and securing its cinsent.

172Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
-1918 - 1914bi dû perçan ve dihate biderkevtin û ew di navbera Şahînşahîya Iranî û Selteneta Osmanî de di pişti şerê çil dêran de di sala 1514 de hate biparvekirin" û Selteneta Osmanî ligel Kurdan de di rêya Hozanê Mewlana Idris de peyama sala ı5ı5 de ji bona hiştina Mêrneşînîyên Kurd û serpereştîkirina wan ji bona Kurdistanê date bigirêdan". Ev peymana hanê wetov hatibû bimorkirin.

it wil be understood from this summary why the draft law was opposed with such

energy by the Kurdish Deputies as described above.
I have,şc.
Horace Rumbold
High Commissioner."
Ev ji nivîsta: "The emergence of Kurdish Nationalism and the Sheikh Said Rebellion. 1880 - 1925, by Robert Olson, University of Texas Press, Austin, 1989"
r. 166 - 1'68 hatîye biwergirtin.
50Ji xwe bi dûr û dirêjî ve li ser vî şerê hanê û encamên wî de û herwehajî li ser
dema wî de bi zimanê Elmanî ve di .Weletgeschichte" bergê 4, r. 610 - 613, de
beramber bi Selteneta Osmanî de û herwehajî beramberî bi vî bi şerê hanê û
encamên wî de û dema dewleta Sefewî de li Iranê de di vê nivîsta hanê de, r. 626-
635de, VEB DeutscherbVerlaag der Wissenschaften, Berlin 1964 de bidin bitemaşekirin.
51Ji xwe re di vî warê hanê de pir û bi dûr û dirêjî ve li nivîsata M. M. van Bruinessen de bi zimanê Elmanî ve di bin nav û nîşana: " Agha, Scheich und Staat"
-Axa, Şêx û Dewlet- de, r. 186 - 244, Edition Paraboli, Berlin sala 1989 de bidin
bitemaşkirin. Ev nivista hanê pir bi nerx ve tête biderkevtin. Nivîsvanê wêna di vê
dema me de pir caran ji bona nava herçar perçên Kurdistanê de hatiyê biçûyîn û li

wê derê de xwendekarîyên xweyî civakî li ser civaka kurdistanê de dane bikirin. Pir
agehdariyên mêjûyî û kaniyin li ser miletê Kurd de têde têtin biditin û ew bi
kanîyeke pir baş ve li ser mêjûwa Kurdistanê û xebata miletê Kurd ve tête biderkevtin. Ew di sala 1975 de di dema kevtina şûreşa Kurdistana Iraqê de li nik
Pêşmerge de dihate bidîtin û ew jî ligel Pêşmege de ji bona nava Iranê hate
biderbasbûn. Wî pir bi dûr û dirêjî ve li ser şûreşa Kurdistana Iraqê de dayite
binivî sandin û têde pir agehdarîyên hêja û bîr û bawerîyên bi nerx ve dane
biderkevtin.
173
Ez li vir de Wergerandina Kurmancî ji Xwendevanan re didim pêşkeşkirin. Di bergê yekemî ji Mêjûwa Kurd û Kurdistan de ji bal Mohemed Emin Zekî Beg de bi zaravayê Soranî ve bes û bi tenha nivîsandina
hinekî ji koka wêyî Turkî ji Hammer, bergê 4 hatîye biwergirtin
û binivîsandin. Di bergê Erebî de Peyman hemû ji bona zimanê Erebî hatîye biwergerandin. Ji vê wergerandina hanê wergerandina Kurmancî hatîye bikirin:
"Hêjayê Hêjan, Nîşana Qencan, Rêwiyê Rêya rast, Rêberê Kanîyêrı Ayînê, Bidîtinvanê dujwarîyên Oldariyê, Berê Av û Axê, Hogirê Şah
û Sultanan, Nîşana Xelkên Xwedanê Yektayî û Perestên wî Mewlana Şehrezayê Oldarîyê Idrîs, Xwedê hêjabûnên bêtirbike.
Debera, ew bizanibe, gava ku ev Fermana Bilindî Hayonî pê

bête gihaştin, ku Nameya we bi destên minî bextiyar hate gihaştin. Ew bi vekirina tevaya Wilayeta Diyarbekrê dide mizgînîkirin. Evaya jî tevde başbûna Oldarîya we, pêsipartina we, dilsozîya we û rastîya we dide biderxistin, mîna ku ev tevde ji we tête hêvîkirin. Xwedê Ruwê we bide bisipîkirin. .

Ger Xwedayê Bilind xwest, dê tu bi hoyê vekirina tevaya Wilayetan bête kirin. Tevaya Guhpêdanên rnînî bilindî Patîşahî ber bi we ve têtin vekirin û ew ji bona we likarin.

Ligel Manganeyên weyî taybetî tanî Meha Şewala piroz du hezar Zêrê Filorî, Kurkekî Simore û yekekî Weşeq, du bergên Hirî, du bergên Çox, Kurkekî Hirî bi Kurkekî Simore betankirî, Kurkekî Hirî bi Kurkekî Weşeq betankiri û Şûrekî Zêrkirî bi Kalenekî pêcayî bi Coxekî Firengî ez didim rêkirin. Gava ku ew bi te bêtin gihandin, ger ku Xwedayê Merd xwest, dê tu wan bi Xweşi û bextiyarî bide girtin û tê wan ji bona xwe bide xerckirin. Debera, tu bi Xweşi bijî; jiber tu bi hêjayî bi van rengên pir ji Dilovaniyên minî Patîşahîyî bi nerx tête biderbikevtin. Evanan jî tevde ji bona karên te û Diyarîne ji bona Rastî û Dilsoziya te ji te re têtin pêşkeşkirin.

Jiber Mîrên, yên ku ew ji Diyarbekir hatin û wan bi dû te dan, tu li ser zîneta wan, li ser Nav û Nîşanên wan, li ser Sinceqên Wilayetê, yên ku ew ji bona wan divê bêtin binîşankirin, li ser Dostanî , Dilsozîya ,Kamasî û kar û barên wan agehdare; jibervêjî min ji te re Fermanên Patîşahîyî Bilind Sipi bi Mora minî Bilind hatîye

174Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

bimorkirin û ew ji bona Rûmetvanên Mîrên Mezin, Pîşta Serbi1indên Gewre, Xwedîyê karin û rêzlêgirtinê, Xwedîyê Nav û Nîşanan, ~iştgirtvanê bi rengên pir ji layê Xwedayê mayînê, Mîrê Mîrên Diyarbekir Mohemed Xwedê ber wî xweş bike.

Divê hûn belgeyên Sultanî li ser zîneta Sincenqên, yên ku hûn
wan ji bona her Mîrekî didin nîşankirin, bidin binivîsandin. Herwehajî
Nav û Nîşanên wan jî, erdên bi wan dayî bi rengekî baş û bitomarkirina
wêneyên wan belgeyên Sultanî bî dûr û dirêjî û perên ji bona
wan nîşankirî di Deftereke taybeti de bête nivîsandin û ew ji bona nik
min bête binardin. Da ku ew li vêderê de bête hilanîn û her tişt diyar û
liberketî be. Herwehajî lige1jî bîrxistinek dûr û dirêj li ser
Sinceqanme1bendan,
yên ku te ew ji bona Mîran dane pêşkeşkirin û çawabûna
dana wan, şêweyê nivisandina nav û nîşanên wan û Diyariyên wan bi
mercekî ev biparvekirin û û danên hanê bi kokê nedin kêrkirin, da ku
ew pêwendîyên di nava wan de neyêtin lawaz û lerizandin.
Herwehaji min ji te re pelên Sipî morkirin bi nîşana Bilindî
Sultanî datin rêkirin, da ku tu wan ji bona wan Mîran bide binivîsandin,
yên ku tu nivisandina wan baş dibîne. Tu li gora kêfa xwe
dikare wan bide binivîsandin û wan ligel Diyarîyên Patîşahî bide
rêkirin. Di pişt re tu dikare wêneyên wan belgeyên Sultanî, çawabûna
diyarîyên wan û şêweyê reftarkirina ligel wan de di deftereke taybetî
de bide bitomarkirin û wê ji bona nik cihê min bide rêkirin, ya ku ew
penebûna dunyayê ye. Da ku her tiştek bi dûr û dirêjî ve bi diyar ve
bête biderkevtin.
Guhpêdana Sultanî di vî warê hanê ew li ser mebesta minî qenc
bû. Ger ku Xwedayê Bilind xwest, dê mêldarîya min li ser wî wari de
bête bigirêdan. Bawerbik, ku Mêldarîya min li ser wan Mîran pir ji
hêvîya wan mezintir tête biderbikevtin.
Neha Ismaîl El-Delalî Kurê Şêxê erdebîlî Hesen Beg û Behram
Axa ji Peyên xwe bi Peyamberî ji bona nik cihê min dane birêkirin.
Wan kaxezeke nivîsandî bi xwe re anîne, ku ew têde pir rengên jêrbûnê,

berdestiyê, xwebiavêtine, şelafiyê û donkirinê ji bona bigirêdana Lihevhatinê û Aşitîyê didin biderxistin. Ew dibêjin, ku ew bi tevaya daxwaz û xwestîyên me bê qeyd û şert pê têtin birûniştin. Lêbelê divê bawerî bi peyvên wî û nêta wîyî pak neyête kirin; jibervêjî min fermana zîndankirina Herdu Peyamberan di keleha Dîmotqe de û
175
Peyên wan di keleha Kilîd El-Behir de date bidan. Divê li ser te. tu ii ii aliyî xwe de bi baştirîn pêrabûn beramber bi yê navkirî bête birabûn, da ku ew pir bi pêgîrî ji bona kar tî barên tî berjewendiya dewleta minî hermayî di dirêjbûna rojan de bi kêrbin.
Di dawi de ez hêvîya kar Ü barên bilind û bi şop ve ji te didim bikirin. Vê bizan û pişta xwe bi Nîşana minî pak ve bide bigirtin.
Di Navîna Meha Şewala Pîrozî Sala Nehsed û Bîst û Yekê Koçî de di cihê Xanîyê Xilafetê de hatîye binivîsandin. Edeme.
)Pêşîya çirya duwem sala 1515 z. de."(
Ev peymana hanê di sala 1846 de ji bal selteneta Osmanî de hate bihilanîn". Der sala 1847 de dawîya Mîrneşînîya Kurdîyî Berdixanîyan li ser destên Selteneta Osamanî de hate bidawîkirin. Ji vê pêlê tî pêve pêla Şêxitîyê di nava kurdistanê de bi xurtî ve date bidestpêkirîn tî di pêşî de ew ji bal dewleta Selteneta Osamanî de pişt li wan de dihate bigirtin û piştî ku wan cih ji xwe re dane bigirtin ü xwe dane bixurtkirin, wan serên xwe li ber dewleta Selteneta OS<1l11nÎ de datin biberzkirin û di pişt re hemû serhildan û Şûreşêrı Kurdistanê li ser destên Şêx LÎ Merovên Oldarî de jiber cihên wanî dunyayî LÎ oldarî di nava civaka kurdistanê de dihatin bidestpêkirin û wan rêberiya
~5Ji xwe re li Helmuth V. Moltke de di nivîsta wî de bi zimanê Elmanî ve li jêr

navrıişanar'Unter dem halbmod -Erlebnisse in der alten Türkei- " -Li jêr Nivheyvê
de, dîtinên min di Turkiya kevin de ji sala 1835 - 1839 de, r. 220 - 340, Vcrlag
NEUES Leben Berlin 1984 de bidin biternaşekirin. Moltke (1800 - 189 1) yekek ji
gewretîn û bi nav bangtirîn Sipahdarên Elmanî ve tête biderkevtin. Ev nivista wi bi
namên wî ve tête biderkevtin, yên ku wî ji bona Elmanya li ser rewş Û zinetên
Selteneta Osmanî de didate binivîsandin. Wehajî wi di çend nameyên xwe de xweser
li ser Kurdan, welatê wan Kurdistanê de û şerên Selteneta Osmanî ligel wan de date
binivisandırı, di yên ku ew ligel sipahê Osmanî de bi çavên xwe didetin bidiıin. Ev
nivista bi baştirîn nivîst li ser Selteneta Osmanî de di herifandina wê de tête
biderkevtin û herwehaji li ser Kurd de bi pir belgeyekî mêjûyî bilind ve tête
biderkevtin. Bi destên Moltke ve (1800 - 1891) bi nala Sipahsalarê Elmarıê ve di 2.
1970 .9di şerê Sedan -Sidan- de dîlkirina Patişahê Firensî hate bikirin û di sala 187 I
de bi saya vî şerê hanê ve û bi saya siyaseta Bismarck ve (1815 - 1898) Elmanya li
Kaxa Vesailles -Feresay de Yekitiya Elmanya hate bidazanin; jiber ku Elmanya di

berê de bu 2 000 herên Gurnriki ve û bi 360 Mirneşinî ve dihate biderkevtin.

176Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

---

xebata rizgarikirina kurdistanê ji nava lepên dewleta Selterıeta Osamî de bi ser milên xwe ve dane bihildan. Wan pir bi dilsozî ve ji bona azadikirina welat û miletê xwe dane bixebatkirin û pir mal û can bi merdayetî ve di wê rêya rûmetê de dane bigorîkirin. Ji gewretirîn û giringtirîn şûreşêrı mîlî de di Kurdistanê de di vê pêla hanê de Şureşa Şêx Ubeydul-Lahê Nehrî der sala 1880 ji bona serxwebûna Kurdistanê tête biderkevtin.

Li ser bingehê vê peymana Sayks - Piko de ji dêlva du perçebûna Kurdistanê ew di encamê dawî de ew ji bal Impiryalîya Ingilîz û Firensî de ji bona berjewendiya ji bona çar perçan hate biparvekin. Beşek jê bi ser Irqê ve di peymana sala 1926 de piştî çarekirina pirsa Musilê di navbera Ingilîz û Turkan de hate bikirin û beşê din jî jê di sala 1922 di navbera Firensa û Turkan de li ser bingehê peymana Enqera de hate bikirin.

Basiyên faşiyên Surî di bin Rebcrîya Mişêl Efleq de ev rastîyên mêjûyî bi carekê ve dane bijibîrakirin 0 wan her û her dixwestin Kurdan di lûla Erebî de bidin bihilandin: jibervêjî ve wan der sala 1962 de Amara j irêdckcvti de liser Kurdan de datin bicihanîn, ku bêtir ji sedûbisthczar Kurd ji mafeyî Neşinvaniya dewletê hatin bibêpişk li bibêparvck irin li herwchaji jibervêjî ve wan Kembera Erebî di Kurdistana Surî de li ser tuxûbcn Turkî de bi dirêjbûna 350 Km û bi panbûna 15 tanî 25 Km ve dane bicianin.

Rojnama EI-Munadil rojnameyeke siyasî ye, ya ku ew ji bona nava hundurê partîya Basî Surî de ji bal Rêberiya milîyî Partîya Basî

de tête bidcrkcvtin, jimar yarızdeh, nîvê befirbara sala 1966 de wetov li ser .Pirojcyê Çandîyên Dewletê di Parêzgeha Hesekê" de bi dûr û dirêjî ve dide binivîsandin. Em bes tl bi tenha ve ji bona li berkevtinê de hinekî ji vê rojnama hanê de hinekî ji xwe re didin biwergirtîn û ji zimanê Erebî didin biwergerarıdin. Belam pir bi baş ve tête biderkevtin, ku tevaya piroje bête bixwedekarîkirin, da ku bêtir ji li ser vê pirojeyê rehperestîyî Basî de bête biliberkevtin. Ev pirojeyê Çanidinên Dewletê di Parezgeha Hesekê de wetov dide bidestpêkirin:
.,Metirsîyên ku Impiryalîyê dane bi dunıstkirin û yên ku ew ji bona miletê meyî Erebî de di Jorî Iraqê de hatinê tl têtin birûkirin, wan dane bidcstpêkirin, ku ew serên xwe li Parêzgeha Hesekê de ji bona me ji berî çend salan de bidin biberzkirin, ev jî dide bi pêwistîkirin, jiber ku
177
piranîya serdarîyên çûyî di serguhên xwe re çarekirineke Erebîyî ji rehan de van metirsên hanê dabûn biavêtin. Jibervêjî Munadil ji bona beşdarbûna wêna di vî karê hanêyî giştî de ji bona nava destên Hevalan Pirojeyekî pêşîyi ji raporteki dide bixistin, ji yê ku Nivîsgeha Cotkaran li ser hin pêrabûnêrı bi cihatî de û ji yên pêşneyarkirî de ji bona rû bi rûkirina vê pêrsa hanê ve di ayinde de bête bikirin."
"Li ser Zineta Serûştî de:
Tevaya topraxa giştîyi ji bona vê xêza hanê, ya ku em di derbarê wê de didin biaxivtin, bi 3001911 Donim tête biderkevtin û ew li ser dirêjîya sînorê Iraqê Surîyî Jorîyî Rojhilatî de ji herema Malikîyê di navbera gundên Til Ehmer û Qelet El-Husen li ser sînorê Iraqê de tanî sînorê cudakirî di navbera Parêzgeha Hesekê û Reqa de di navbera Til Qelîe û Rechan de û dorhêlên wan de û ji Bîr Xatun tête biderkevtin, ya ku ew di navbera 454 heremên çandinî de tête bibelavkirin."?

53Ev navên hatiyî Erebî bi carekê ve ji navên Kurdî hatine biwergerandin; jiber ku
siyaseta Basî wetov didate bixwestin, ku navên Kurdî bi darê zorê ve mîna kirina
Turkan di Kurdistana Turkî de ji xwe re ew di Kurdistana Surî de bidin bierebkirin.
Herwehaji navên Kurdî di tomarkirina Zarokan de nedin biwergirtin, da ku ew
heremên Kurdî û Merovên Kurd bi navên Erebî ve bidin bierbkirin.
Bav û Kalên me di pêla Musulmantiyê de navên Ereban ji dil û can li
Zarokên xwe de didatin bikirin; jiber ku ew bi Muslman ve dihatin biderkevtin.
Herwehajî Miletên Iranî, Pakistanî, Turkî û pir miletên dinî Musulman jiber oldarîya
musulmantiyê navên Ereban ji dil û can li Zarokên xwe de didatin bikarin, Magelo
ew bi Ereb ve dihatin biderkevtin? Herwehaji piranîya navên miletên Eropi ji bona
nimûne jiber oldarîya fıletîyê ve bi navên Cuhan ve têtin biderkevtin, magelo ew
miletên Eropîyî hanê bi miletê Cihû ve têtin biderkevtin?
Belam Basiyan didatin bixwestirı, ku ew bi darê zorê ve navên Kurdan
bidin bierebkirin. Magelo dê Kurd wetov bêtin bierebkirin? Herwehaji magelo dê
welatek û miletek wetov mîna Kurd bi vê siyaseta hanê ve ji ser ruwê ziminê de bête
bihilarıin?

Serpêhatiya mêjûwa meyî tirş û tal ji me re dide bi eşkerekirin, ku wetov jî
Rom welatê me nala Zarokên Omer di destpêka nîvê sedsalê heftehemîn de bi saya
buhuşta evsana Ereb ve didatin bikavil û wêrankirin û dewlemendîya wî ji xwe re
didatin bitalankirin û miletê me ji xwe re bi sedan sal ve didatin bikole û bendekirin.
Belê wan em her û her di nava xwînê de didatin bivegevizandin, her gava ku me didate
bigotin, ku em jî merovin û bi serdejî ve em kurdin.
178Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
"Tevaya gundên di vê heremanê hanê de bi 385 gund ve têtin biderkevtin; jibervêjî ve remankirin bi hilanîn û danîna wê ve bi vî rengê hanê ve di nava derbasbûna salan re dê pir dijwarîyan bidin bidurustkirin, Jibervêjî ve em didin bipêşneyarkirin:
ku fermaneke yasayî bête biderkevtin, ku ew vê herema hanê ji Xwedîyên wan bide bisitendin û bi mafeyê dewletê ve bête biderkevtin, ku ew wê herema hanê li gora xwestina xwe de bide
Belam bi saya zurna sor ve Ebced Hewez roj bi roj ve tête bitarûmarkirin û
gemara buhuşta evsana Ereb ji nava nîvî mejîyê me tête bimalandin û derdên giranî
Yarîyan piçekî ji nû ve di vê serdema Newroza Kurdistan me de tête bidermankirin.
Hewara Pîrên Moganên min ji nava Laleşa peresta Bav û kalên min di nava

bextê mêjûwa me de ji nû ve bi xurtî ve di dema şiyarkirina milî û rizgarîkirina
Kurdistanê de ji bin gemara tapanên Rom, Ereb û Ecem de tête bibilindkirin.
Her Miletek di vê dunyayê de di ayîn û oldarîya xwe de divê bi zad ve bête biderkevtin û rêz û hêjabûn li tevaya oldarîya wan de bête bigirtin, lê rojekê ji rojan de
ne ayînî û nejî oldarî ji bona bendekiıina miletekî divê neyêtin bikaranîn, mîna ku tanî
neha ew ji bal Ereb û Rom de bi beramberî miletê Kurd ve di Kurdistanê de hatiyê û
tête bikaranîn.
Çi gava ku ev hate bikirin, bi neçarî ve li ser serpêhatiya mêjûwa miletan de
her û her ew ayînî û oldarî ji nava wî welatî û miletî bi darê zorê ve bi hinera qanûnên
jînê ve û bi derbasbûna demê re hatîye biderkirin û bihilanîn yanjî ew ji nû ve hatîye
bimilîkirin, mîna ku ev di sedsalên Vejandinê de li Elmanîya de di rêya Pirotistantîyê
de, li Ingilstanê de di rêya Engilikanî de û herwehajî di pir Welatên dinî Ewropî de bi
milîkirina Filetîyê ve hate biderkevtin û tevaya Oldariyê di bin zalbûna dewletê de
mîna hercar di seranserîya mêjû de û ji bona qazanc û beıjewendîya wêyî milî dihate
bidîtin. Wetov bi carekê ve cudabûn di navbera ayîrıê û dewletê de hate biderkevtin.

Ayinêyê xwe ji destdirêjîya siyaseta di nava dewletê û civakê de bi carekê ve date
bikişandin. Belam ji bal dewletê jî de pir rêz û hejabûn ji bona dam û destgehên ayînî
de dihatin û têtin biderkevtin.
Herwehajî tanî radeyekî biçûk jî ev di pêla Ebasîyan jî de dihate biderkevtin û
bi Firskirina Musulmantiyê ve di rêya Rêça Şiî de di. pêla Sefewî de di sedsalên
Panzdehan de ev hate bitac û bixelatkirin, berî ku ev karê hanê li Ewropa Vejandî de
bête bikirin.
Tevaya mêjûwa ayînî û oldariyên kevnar di Rojhilat de û himjî di Rojava de vê rastîya tirş û tal dide biderxistin.
179
bihilanîn Û bidanin; jiber ku zîneta neha nikare bête bihiştin, mîna ku me dabû bi pesinandin .... Herwehajî jiber ku piranîya Xelkên vê herema hanê, ji yên ku mulkên wan têde têtin bidîtin, ji Merovên ne Erebî têtin biderkevtin.
Divê serûştîya Xelkên vê heremana hanê di rêya barkirinê de
bête biveguhertin û herwehajî divê Ruwên ne Erebî ji vê herema sinorî bêtin bidûrkirin."
Rojnama EI-Munadil bi dûr û dirêjî ve li ser vê herema hanê de ji alîyê civakî û siyasî de dide bi axivtin û çilo û çawan dê wê bi baştir ve bidin bierebkirin.
Herwehajî Partîya Demokrata kurd li Surî de bîrxistinek bi dûr
û dirêjî veji bona Serokê Dewleta Surî de di babetê Kembera Erebî de di 15. 9. 1966 de date binardin, ku têde careke din tevaya zordarîya

siyaseta Dewleta Surîyî nerewa beramberî miletê Kurd li Surî de dide biderxistin. Herwehajî ew di wê bîrxistina xwe de dostanîya kurd û Erebî mêjûyî ji pêla cenga Xacperestan û herwehajî di pêla kolonyalîya Firensî ligel miletê Ereb dide biderxistin. Herwehajî ew di wê bîrxistina xwe de dide biderxistin, ku ev karê hanê ji bal Kevneperestîya Ereb berambe bi Kurd ve tête biderkevtin û ew ne bes bi dijî Kurd ve; lêbelêjî bi rastî ve bi dijî berjewendîya miletê Ereb ve di dawîya dawî de tête biderkevtin.

Partî pir nimûneyên wê siyaseta Kembera Erebîyî sitemkar de li ser Kurdan dide bianîn û ew ji bona ji bona Serkê Dewleta Surî dide bibangkirin, ku ew wê Kembera Erebîyî zordar û sitembar berambe bi miletê Kurd ve li Surî de bide bihilanîn; jiber ku siyaseta hovînî di nava tu welat û dewletan de di vê dunyayê de nehatîye biserkevtin û hêjibêtir pê tu pirsî milî jî nehatine biçarekirin.

Di dawîya dawî de ev bi bîrxistina hanê wetov têtebidawîkirin:

"Herbijî xebata milet li pênavê serdarîyeke demokrasîyî rasteqî. Herbijî biratîya Ereb û Kurd, ya ku ew bi tehtekê ve têtebiderkevtin, ku li ser wê de tevaya siyasetên Kevneperestîyê têtin bitarûmarrkirin."

Wetov hîç ev Merovên Rehperestên hanêyî Ereb nizanîn, ku Kurd ji berî bêtir j i pênc hezar sal ji pêla Sornerî de û tanî neha de û bi bê birîn ve li vê herema hanê de li jêr hemû hilat û dihatin jînê de têtin 180Li ser rêya azadîya Kurdistanê de bijîyandin. Ma dê çilo û çawan ev Basîyên çepel û guriyên mêjûwê vî miletê hanê di vî sedsalê me de, belê di vê serdema me de bi darê zorê ve û bi vê siyaseta rehperest ve bidin bierebkim? Her Merovekî, yê ku ew ji xwe re mêjûwa merovanîyê piçekî dide bizanin, bi başî ve têtebiliberkevtin, ku Basî bi vê siyaseta xwe ve di encamê dawî de bi lez

ve di nava Kurdistanê de gora xwe ji xwe re didin bikolandin, yanji dê pir bi leztir ve xwe ji nava Kurdistana meyî perest de bidin bipengizandin û ev jî dê pir bi ziyan wan ve di dawîya dawî de bi neçarî ve hête biderkevtin û herwehajî dê ew di encamê dawî de ji neft û ava Kurdistanê bêtin bibêpişkirin û bibêparkirin; jiber ku ev neft û ava hanê di· Kurdistanê de bi bomba demê ve li bin lingên wan de tête biderkevtin; heger ku ew wetov li ser vê siyaseta Basîyî faşî de beramber bi çarekirina pirsa Kurd û Kurdistanê ve bidin bireftarîkirin û heger ku ew wê li ser bingehê mafeyê çarenûs de bi aşîtî û demokrasî ve li ser berjewendîya miletê Kurd û Ereb de nedin biçarekirin.Magelo dê miletê Ereb li ber vê rastîya tirş û tal ve bête bikevtin? Ez bersîva vê pirsê him ji bona Dilsoz û Zanistvanên Ereb de û himjî ji bona demê de didim bihiştin.

Basîyên faşîyên Efleqî bi xurtî ve bi erebkirina Kurd ve di kurdistana Surî de dane bidestpêkirin. Jibervêjî ve di vê dema erebkirina Kurd û Kurdistanê de ji bal Faşiyên Efleqî de di Surî de ew hêrîşa rehperestî ji bal Basiyên Surî bi xurtî ve li ser Peymana Avdarê de dihate bikirin, Jiber ku di wê' peymana hanê de bi şêweyekî demokrasî ve bi mafeyên milî ve ji bona gelê Kurd di Kurdistana Iraqê de pê dihate birûniştin û ev bi rast û durust ve bi dijî siyaseta regezperestîyî faşîyên basîyên Efleqîyî Surî ve dihate biderkevtin. Bes û bi tenha ve gurî, kotî û çepelên mîna sêwîyê Efleqê faşiyê Ereb ji xwe re didatin biremankirin ku dê ew bikaribin Kurd û Kurdistabê di sedsalên bîstan de bidin bierebkirin. Van kesên mîna Efelq di nava Ereban de tevî li hemû pêgihiştina derd û ziyanên wan de ji bona miletê Kurd de di xebata wî de ji bona serxwebûnê deha ziyanên gewretir û malwêrantir wan di encamê de bi milet û welatên Ereb ve datin bigihandin. Herwehajî ew bi vê siyaseta hanê ve pir ji bona

pêkanîna dewletekemilîyî serbixwe ve di nava Kurdistanê de pê didin bilezkirin.

181

Ev rastîya hanê li ser bingehê serpêhatiya miletan de di tevaya dirêjbûna mêjûwa xebata wanî milî de ji bona serxwebûnê û ji bona rizgarîkirina wan ji nava lep û pencên Dagirkerên xwe de rep û rast tête biderkevtin.

Li gora têgihiştîna diyalêktîka felsefa mêjûwê de li ser ramana Aristo, Xanî, Hegel û Marx de bi eşkere û diyar ve tête biderkevtin, ku Merovên mîna rehperestên Mişêl Efleq di nava Ereb, Rom û Ecem de deha bi leztir û bêtir ve ji bona me Kurdan ji bona serxwebûna tevaya Kurdistanê û pêkanîna dewleteke milîyî serbixwe ve didin bikarkirin. Heger rojekê ji rojan jî bihata bidîtin, ku Merov ji Dujminê xwe re li ser diritî û hovitiya wina de bida bisipaskirin, wetov dê bihata biderkevtin, ku divabûn Kurd ji bona bi lezkirina serxwebûna tevaya Kurdistanê û pêkhatina dewleta wanî miliyi serbixwe ve ji bona wan Merovên mîna Mişêl Efleq di nava Ereb, Rom û Ecem de bidana bisipasîkirin. Belê ev tirş û talîyên hanê tevde di diyalêktîka jînê de têtin biderkevtin. Di erînê de nayin tête bipeydakirin û di nayînê de erîn tête bipeydakirin. Cîhan ne li gora dibijandinê yanjî kînê de hate biavakirin û ew nejî nejî li gora dilbijandinê yanjî kînê de dê bête biwêrankirin. Di pêşî de ne gotin dihate bidîtin, belam mîna ku Gotê di Fawist de dide bigotin, ku di pêşî de Kar tête bidîtin.

Çi gava ku merov bi rast û durustî ve li ber vê qanûna diyalêktîkî de bête biliberkevtin, Merov dikare bi hêsanî ve pêşbîniya tevaya xebata miletê kurd ji bona serxwebûna Kurdistanê û pêkanîna dewleteke milîyî serbixwe ve bide bidîtin û hêjîbetir rê û banên hêsantir bi kêm gorîtir ve û di demê de bi kurtir ve ji bona serxwebûna

Kurdistanê û pêkanîna dewleteke milîyi serbixwe ve bide bipeydakirin ûji bona vê armanca perest jî bide bixebatkirin.
Pirsa miletan di tevaya mêjûwa Merovanîyê de bes û bi tenha ve li ser bingehê zanebûn û zanistîyê de hatîye biçarekirin û ew bes û bi tenha jî ve li ser bingehên zanebûn û zanistiyê de dikarin bêtin birizgarîkirin û ew di hemû warên jînê de dikarin bêtin bipêşvekevtin û bigeşkirin. Di tevaya mêjûwa Merovanîyê de ji dema nivîsandina wê de ji berî şeş hezar sal ü bêtir de hemû qanûn, yasa, ayîn û xwedan bes û bi tenha ve ji bona kara dewletê hatine bipeydakirin û biafirandin. Çi aava ku mileteteki di seranserî mêjûwa nivisandiyî Merovanîyê de ev rastîya hanê ji xwe re dayite bijibirakirin, ew bi neçarî ve hatiye
182Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
bibindcstkirin, yanjî ew hatîye bikole û bibendekirin û hêjîbêtir ew di encamê dawî de ji ser rûwê zemînê de hatîye bihilanîn û bes û bi tenha ve nav LÎ nîşanên wî di nava rûpelên rnêjûwê de hatine bitomarkirin yanjî şopên wî di nava xaniyên hilanînên şopên kevnar de têtin bidîtin.
Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de bi vê peymana IL avdara sala ı970 ve di navbera Rêberiya Kurd de di bin Serokitîya Barzanî de û Serdarîya Iraqê de pê hate bidilşad û bibextiyarîkirin. Wê bi hemû hêzê û hinerên xwe ve li seranserî Ewropa de pişta vê peymana pîroz didate bigirtin û wê di nameyeke taybetî de pîrozbaya xwe ji bona Serokê Komara Iraqê Hesen El-Bekir di 18. 4. 1970 de date binardin. Ez li vê derê de vê nameya hanê bi zimanê Ingilîzî ve ji bona Xwendevanên hêja û berêz didim bitomarkirin:
"The Persident of the Republic of Iraq
El Bakir
Bagdad, Iraq
We welcome your govemment s realistic recognition of the fact that

the Kurdish national question in iraqi Kurdistan can only be solved by peacful methods. We look upon the peace settlement wich your govemment arranged with the revolutionary leadership of our people on March 11 of this year, after a nine years war, a a renewed confırmation of the historical fact that the national qeustion of any natiorı cannot and will not be solved by force. it is our wish for all the peoples of Iraq that the settlement .Autonorny for Kurdistan and Dcmocracy for Iraq" be realised and remain enduring. For it is only ba means of this settlement that the peoples of Iarq can form aunited front against the enemies of Iraq. it is on this basis that wi wish the government of Iraq success. Long live brotherly harmorıy among all the peoples ofIraq.

The Secretariat

Kurdish Students'Society in Europe

"1970 .4 .18

Di vê nameya rêkiri de ji bona Serokê Komara Iraqê Hesen EIBekir de Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de têde pîrozbaya

183

xwe ji bona serdariya Iraqê de dide biderxistin û herwehajî ew di peymana IL avdarê de têde tevaya dilxweşî û bextîyarîya xwe dide biderxistin, ku ew li ser bingehekî hişmendîyî rast de û herwehajî li ser berjewendiya miletê Ereb û Kurd de hatîye bigirêdan. Ew têde dide bixuyanîkirin, ku rojekê ji rojan di tavaya mêjûwê de pirsiyariya milî bi darê zorê ve nehatiye biçarekirin. Herwehajî ew durujmê şureşa Kurd ji nû ve bi bîra Hesen El-Bekir ve dide bixistin, ku ew jî di .Ewtonomî ji bona Kurdistanê û Demokrasî ji bona Iraqê de" tête bidîtin û ku bêyî vê jî miletê Iraqê nikare xwe li ber dujmminên xwe de bide bigirtin; ji ber ku di vî durujrnê hanê de tevaya biserkevtina

miletê Iraqê têde tête bidîtin û wetov serdarîya Iraqê dikare bête biserkevtin. Di dawî jî de ew bi dirêjbûna biratîyê û lihevhatina di navbera hemû miletê Iraqê de dide bibangkirin.
Herwehajî Xwendevan di vê nameya hanê de tu tîn û germbûrıekê ji xwe re têde nadin bidîtin; jiber ku Sikretarîya me hîç bawerîya wê bi Basîyan ve nedahete biderkevtin, ku ew dê wê peymana 11 avdarê bidin bicianîn; jibervêji ve di vê nameya hanê de girêdan him li ser Demokratîyê de û himjî li ser serpêhatiya mêjûwê de dihate bikirin, ku bi bê bicîanîna demokrasîyê di Iraqê de û bi darê zorê ve pirsa Kurd nikare bête biçarekirin. Di encamê dawî de ev bîr û baweriya li ser Basiyan de bi rast û durust ve hate biderkevtin.
Ev peymana pîroz ne bes tenê li qazanc û berjewendiya gelê Kurd de dihate biderkevtin; lêbelêjî pêrejî ew li qazanc û berjewendiya gelê Ereb jî de li Iraqê de bi xwe jî ve dihate biderkevtin. Cara pêşî bû, ku di rnêjûwa Rojhilata Navînî de pirsa Kurd di nava perçeyekî ji Kurdistanê de bi şêweyekî demokrasî ve bi mîrî ve û hêjîbêtir bi dilê gelê Kurd ve hatîbû biçarekirin. Belê vê peymana mêjûyî dergehekî mezin li ber xebata gelê Kurd de di seranseri Kurdistanê de ji bona çarekirina pirsa wîyî milî bi şêweyekî demokrasî ve date bivekirin. Ev peymana pîroz bi kulmeke xurt û mezin ve ji bona şovinîyê, kevneperestiyê û impiryalizmê de di deverê de dihate biderkevtin; jiber ku çarekirina pirsa Kurd di Kurdistanê bi şêweyekî demokrasî ve li qazanc û berjewendîyên miletên Ereb, Turk û Faris de dihate biderkevtin û biservajî vêjî ve ew bi dijî qazanc û berjewendîyên kevneperestîyê.şovînizmê û impiryalizmê ve di devera Rojhilata Navînî de dihate biderkevtin.
184Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Çend jî hêzên pêşverû bi vê peymana mêjûyî ve pê dihatin

bibextiyarîkirin, weha deha jî hêzên kevneperestiyê, şovînistîyê û impiryalizê pê dihatin bizikreşkirin û bikîndarîkirin. Weha deha bêtir wan vîlika dek û dolabên xwe li ser vê peymana mûjûyî de didatin bihûnandin û bitevinkirin. Kevneperestî û rehperestîya Erebî di seranserî Rojhilata Navînî de bi alîkarîya impiryalizmê ve û nemaze bi yarmetîya impiryalîya Emerîkî ve bi xurtî ve bi dijî vê peymana 11 avdara pîroz ve dihatin birawestandin û bi dijî wê jî ve didatin bişerkirin.

Çarekinıia pirsa Kurd li Iraqê de bi şêweyekî demokrasî ve li ser kara Kurd û Ereb de bi mîxekî tûj û dirêj ve di nava nîvî tabûta hêzên tarîyî Ereb, Rom û Ecem de di Rojhilata Navînê de dihate biderkevtin û dê wî ew di nava demê de di wê tabûta hanê de didana bimûmkirin. Herwehajî hêjîbêtir çarekirina vê pirsa hestyarîyî milî di nava Kurdistana Iraqê de û di Rojhilana Navînî de bi yarmetî û kêra Sovyêtê ve bi gîsnekî pir tûj û giran ve di nava nîvê çavên impiryalizmê de di Rojhilata Navî de dihate biderkevtin. Vê yarmetî û kêra Sovyêtê ji bona çarekirina pirsa Kurd bi şêweyekî demokrasî ve metirsîyeke pir mezin û di dûr de pir bi kêr ve li ser berjewendîyên Impiryalizmê û Hevalbendên wan de di deverê de didatin biderxistin; jiber ku ev cihê Kurdistanêyî hanê di deverê de di warê cihê siyasî û abûrî de roleke pir ging û giran jêre tête bidîtinn. Vê dostanîya Iraqê û Sovyêtê giringbûneke weyî giranî mezin bi taybetî ve li ser ayinda Kendava Farisî de dihate biderkevtin, ya ku jê bêtir ji 80 tanî 85 % der sed de ji nîyazîya Tîna Çapan û dewletên Ewropa Rojava de dihatin biderkevtin û jê jî dihatin bihatin. Him li ser vê Kendava Farîsî de kanîyên neftê dihatin bidîtîn û himjî têre lûlên neftê, reh û damarên jîna abûrîyî dewletên Impiryalizmê têre dihatin biderbasbûn, Di vî cihê hanê de 60% ji sedî ji tevaya nefta cîhanêyî neha de tête

biderkevtin, ya ku ew bi dehan sal ve ji bal Kompanîyên Impiyalîyê de tête bitalankirin. Herwehajî di nava Kurdistana me de ji bal dewlêtên Dagirkerên Kurdistan de ji bal Dagîrkerên Iraqî de di Kurdistana Iraqê 90melyon nefet, ji bal Dagîrkerên Rom de 8 melyon neft û ji bala Dagirkerên Surî de 12 melyon neft sal bi sal ve têtin bitalanîkirin, mîna ku Kolonyaliya Sipanî û Portogalî talanîya dewlemendîya welatên miletên kokîyî Emerîkî ji sala 1492 de bi hovberî ve didatin 185
bitalankirin. Bi çend Km ve bi durbûn ve ji van kanîyên gewreyî neftê de hêjî miletê Kurd agirê xwe bi tepikê rêxê ve, bi serkul û buşkulan ve bi pûş û kayî ve, bi qunnikan û darikan ve û bi dar û êzingan ve didin bivêxistin. Bes û bi tenha ve Dagirkerên Kurdistanê ji Rom û Ereb bi perên talankirina nefta me ve gulên top û tankan, bombên balafiran û napalman bi ser miletê ve didin bibarandîn û welatê me pê bidin biwêrankirin û bi serdejî ve miletê me pê didin bikole û bendekirin, na hêjîbêtir ew dixwazin wî bidin biqirkirin. Hêjîbêtir tevaya hilanîna nefta cîhanêyî dozandî de neha bi 1400, 6 bilyon ton nefte ve têtе biderkevtin, ji jê jî 9% der sed de di nava Kurdistana me de têtе biderkevtin.
Welatê me Kurdistan pir bi paşkevtî ve û miletê me pir bi perîşan ve têtе biderkevtin; jiber ku welatê me pir bi dewlemend ve di Rojhilata Navînî de têtе biderkcvtin."
Zanistvanên Siyasîyî vê dunyayê di neha de ji xwe re didin bigotin: Kê Kendava Farisî ji xwe re ji bona nava destên xwe ve date bixistin, wî tevaya Ewropa û Çapanê bi nava destên xwe ve date bixistin û kê Ewropa û Çapan bi nava destên xwe ve date bixistin, wî tevaya dunyayê bi nava destên xwe ve date bixistin. Jibervêjî ve her û her di mêjûwê de ji mêj de ji pêla Qeyserî Rusî de her û her Rusan ji

xwe xewin bi vegirtina deşta Furatê ve didatin bidîtin. Wan bêtir ji dused salî ve di pirsa Rojhilat de ligel ıngilizan, Firensîyan û Elman de ji bona parvekirina Selteneta Sultanê nexwêş de li ser Bosboros de didate bikarin. Lêbelê jiber ku wan Talankeran di nava xwe de li ser parvekirina Selteneta Osmanî de nedikarîbûn bidana bilihevkirin, rûxandina Seletneta Osmanî dused salî hate biderengîkevtin. Ev şerên hanê di nava dewletê Ewropî de li ser parvekirina Selteneta Osmanî di nava dused salî de li jêr Pirsa Rohilat de di zimanê Ewropê de dihate binavkirin.

Der sala ı833 de ruxandin û mirina wêna li ser destên Ibrahîm Paşa kurê Mohamed Alî Paşa dihate biderkevtin, gava ku ew bi 54Jixwe re di vî warê hanê de li vê rıivîsta hanêyî pir bi nerx ve ji bal S. Losev û Y.

Tyssovsky de "The Middel East Gil Polecy", Progres Publishers Moscov ı984 de

bidin bitemaşkirin.

186Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

leşkerên xweyî xurt ve li Kütahya de li nêzîka Istenbole de dihate birawestin û rêya vegirtin û girtina Istenbolê bi carekê ve bi bê liberxwedan ve dihate biderkevtin; lêbelê vê carê jî bi saya serên dewletên Ewropa Rojava ve bi giştî ve û bi saya serê dewleta Inglistanê bi taybetî ve givaştina man û nemanê ji bona ser Ibrahîm Paşa bi vekişandina xwe ve ji bona Misrê dane bineçarîkirin, da ku ew Misrê ji vegritin û bindestkirina Ingilîz de bide biparastin. Wetov di gulana sala 1833 de li baregehê Ibrahîm Paşa de li Kütahya de peymanek hate bigirêdan û ew bi vekişandinê ve hate bineçarîkirin. Careke din Selteneta Merovê Nexweş bi saya Ingilîz û dewletên dinî Ewropî ve ji ruxandin û mirina xwe ve hate biparstin,"

Herwehajî careke din di sala 1939 de şerekî pir giran û mezin, şerê man û nemanê di navbera Ibrahîm Paşa de û Selteneta Osmanî de di 1839 .6 .24de li pesarê Nesîbînê de li Kurdistanê de hate bivêkevtin. Di vî şerê hanê de sipah Sultan pir bi pîsî ve hate bişikenandin û bitarûmarkirin. Belê careke din pir bi xurtî ve nema Seltena Osmanî ji her car bêtir li ser destên Ibrahîm Paşa de bi diyar ve hate biderkevtin. Mohamed Alî Paşa bi wergirtina tevaya deshilatîya Selteneta Osmanî ve pir hatibû binêzikkirin. Vê carê jî dewletên Rojava ji bil Fimsa de li Ingilistanê di 15. 7. 1840 de bi amadebûna Ingilistanê, Perusya -Elmarıya- Nemsa û Rusa hatin bicivandin û peymanek ji bona parstina yekîtîya Se1teneta Osmanî û rizgarîkirina wêna de ji Mohamed Alî Paşa datin bigirêdan. Di encamê dawî de Mohamed Alî Paşa bi pêrûniştina vê peymana hanê ve bi darê zorê ve hate bineçarîkirırı". Weha careke din li ser destên dewletên zaldarî xurtî Ewropî de Selteneta Osmanîyî genîyî rizyayî ji bona demekê de hate bihiştin."

55Ji xwe re bi dûr û dirêjî ve di vî babetê hanê de li .Weltgeschichte" berge 6, r.

"302VEB Deutscher Verlag der Wissenschaften, Berlin 1969 de bidin bitemaşekirin.

56Ji xwe re li kanîya pêşî de , r. 305 de li ser vê xala pir giring de bidin bitemaşekirin; jiber ku bi dûr û dirêjî ve li ser de hatîye binivîsandin.

57Ji xwe re li kanîya pêşî de di r. 306 de li ser Fermana Sultan de di Xeti Şerîf de

.Tanzimat-i Hairi -Tanzimatê Xeyrî- de di 3. IL. 1839 de bidin bitemaşekirin; jiber

187

Belê heger ku di wê çaxê de Selteneta Osmanî li ser destên

Ibrahîm Paşa de bihata biruxandin; hîç gûman têde nedihate biderkevtin, dê tevaya rewş û zîneta Kurdisanê jî di wê çaxê de bi rengekî din ve bihata biderkevtin, jiber ku pêwendiyên pir xurt di navbera Mîmeşînîyêrı Kurd de bi giştî ve û ligel Mohamed Paşayê Kor58 de bi taybetî ve ligel Ibrahîm Paşa de di sala 1832 de dihatin biderkevtin û Ibrahîm Paşa bi xurtî ve pişta xebata Mîmeşînîyên Kurdan bi dijî Selteneta Osmanî ve didate bigirtin". Selteneta Osmanî bi nexweşîya nema xwe ve tanî sala 1918 de di dawîya cenga cîhanî yekem de date bidirêjkirin û ew bi carekê ve di piştî cengê de hate bijehevkevtin û li ser peymana Sêver de di sala ı920 de parvekirina wêna di nava Ingilîz û Firensa de hate bikirin.

Herwehajî di derbarê Kurd de ev bendên giring û giran têde di cara pêşî de di mêjûwa Kurdistanê de li ser çarekirina pirsa Kurd de ji cihekî wetov berzî balayî Navdewletî de hatin biwergirtin:

ku pêrabûrıên şerê Selterıeta Osmanî der sala 1846 de di bin rêberîya Reşîd Paşa de

di Kurdistanê de bi vê fermana hanê ve tanî radeye kî têtin bigirêdan.

58Ji xwe re li ser vê Mirneşîya Mohamed Kor Paşa de bi rêjî ve li nivîsara J. Bailie

Frser:Travels in Kurdistan ş Mesopotamia" -Geştîyek di Kurdistan û Mêsopotamya

de-, (Richard Bentley, New Burlington st, London 1840 bidin bitemaşekirin. Cafer

El Xeyat beşê duwem ji vê nivista hanê ji bona zimanê Erebî di bin nav û nîşana:

"Geşta Fraser ji bona Bagdad di sala 1834 de" date biwergerandin û ew di çapa

Mearif de li Begdadê de di 30. 8. 1964 de hatîye biçapkirin. Xwendina vî nivista
hanê pir bi nerx ve ji bona têgihiştina pêla Mohamed Kor Paşayê Rewanduz tête
biderkevtin û Xwendevan ji xwe re dikarin jê pir sûd ji bona têgihiştina mêjûwa
Kurd û Kurdistanê û herwehajî ji bona xebata kûrî Bav û Kalên me ji bona serxwebûna Kurdistanê û pêkanîna dewleteke milî di wê demê de bidin biwergirtin.

59Ji xwe re bi dûr û dirêjî ve di vî batê hanê de li nivîsta Munzir Elrnusilî de bi
zimanê Erebî ve: "Ereb û Ekrad" -Ereb û Kurd-, r. 190, Dar Elxusûn, Bêrûd, sala
1986de, bidin bitemaşekirin.

188Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Peymana Sêver"'
Beşê Sêyem: Kurdistan
Benda 62:
"Dê Encûmenk cihê wê li Istenbolê de bête bilidarxistin, ku ew ji sê Endaman de tête bipêkhatin. Her yekî ji wan ji xwe re hersê Dewlet, ya Ingilistanê, ya Firensî û ya Îtalî didin binîşankirin. Evaya jî di navbera şeş mehan de ji bi cihanîna Peymana serxwebûna xweyî tête bikirin. Evaya derbarê heremên ketîyî rojhilatî Furatê û beramberî sinorê jêrî Ermînya, yê ku ew di pişt re dikare bête binîşankirin, ji yên ku Xelkên Kurd di nava wan de têtin birûniştin. Sînorê Turkî ligel Suriyê û Îraqê de dê ew li gora nîşana diyarkirî de di metnê duwem û sêyem de ji movika duwem ji benda jimara 27 bête bidanîn. Lêbelê heger lihevhatin li ser mebestekê de nehate bidîtin, wê çaxê dê ew bi

agehdarîya Endamên Encûmenê ve her yek ji wan ji bona Dewleta xwe wê mebestê bide birêkirin. Ev pirojeya hanê divê girawbûnên têrkirî ji bona parastina Kildanan, Aşûriyan û Kêmayetîyên din, çi Tuxmî yanjî Oldarî bin, di nava van heremên hanê de bêtin bidan. Jiber vê jî dê Encumenek ji Wênerên Birîtanya, Firensa, Îtalya, Eceman û Kurdên Cih bête bidestnîşankirin, da ku ew lê bide bivenerandin û rastkirinan bide bibiryarîkirin, heger ku wê date bidîtin, ku divê ew li ser sinorên Turkan de bêtin bikirin; jiber ku li gora metnên vê Peymana hanê jî de sînorê bi navkirî ve ligel sînorê Ecem jî de tête bisuwarkirin."

eo Ji xwe re li ser peymana Sevres -Sêver- de di ıO. 8. ı920 de bi dûr û dirêjî ve

derbarê Selteneta Osmanî de bi zimanê Elmanî ve di .Welrgeschichte", berge 8, r.

109-1l O, VEB, Deutscher Verlag der Wissenschaft, Berlin 1966 de bidin bitemaşekirin.

189

Benda 63:

"Dewleta Osmanî ji îro û pêve li ser xwe de dide bisozkirin, ku ew dê bi biyarîyên herdu Encumenên, yên ku ew di benda jimara 62 de hatine binavkirin, di navbera sê mehan de ji mêjûwa agehdarêyê de, ji yên ku ew ji bal wan herdu Encumenan de têtin bidazanîn, bête birûniştin û wan bide bicihanîn"

Benda 64:

"Heger ku di nava salekê de ji destpêkirina mêjûwa bicihanîna vê Peymana hanê de Miletê Kurd, yê ku ew li heremên nîşankirî de di benda jimara 62 de tête bineşînîkirin, daxwazek diyar ji bona Koma Netewan de date bipêşkeşkirin, ku piranîya Miletê van heremên hanê

didin bixwestin, ku ew ji Turkîyê bêtin biserxwebûnkirin. Wehajî gerjî vê Koma hanêyî bi navkirî ve date bidîtin, ku ev Miletê hanê ji bona serxwebûnê bi karinê ve tête biderkevtin, wê çaxê ew pê dide bitemînîkirin.

Weha Turkî ji neha de li ser xwe de dide bisozkirin, ku dê ew bi wê Temînîya hanê ve bête birûniştin û ew dê ji hemû mafeyên xwe ve û bi destkevtîyên xwe ve di nava van heremên hanê de bête bidakevtin- dê dûr û dirêjiya van dakevtinên hanê bi Mebesta Lihevhatineke Taybetî ve bête bidîtin, ku dê ew di navbera Dewletên Hevalbendên giring û Turkyê de bête bigirêdan. Heger ku dakevtin bêtin biwergirtin û gava ku ew bêtin biwergirtin, wê çaxê hîç beramberîyekji

bal Dewletên Hevalbendên bi navkirî ve beramberî Yekbûna Kurdan nayête bidîtin, ji yên ku ew li perçê xakê Kurdistana nehayî de di nava Wilayeta Musilê de têtin bijîyandin, ku ew bi hemû azadîya 'vîna xwe ve ligel Dewleta Kurdîyî Serbixwe de bêtin biyekkirin."

Dostanîya Iraqê ligel Soyvêyête de bi qazanc û kara gelê Iraqê ve û herwehajî pêrejî ew bi qazanc û sûda hemû gelên Rojhilata Navînî ve dihate biderkevtin û ev dostanîya hanê jî ji bona miletên deverê ve pir bi ber ve diahte biderkevtin, belam ew ji bona impiryalizma Emerîkî de pir bi bigiran û sengîn ve û himjî bêtir pir bi tirs ve dihate biderkevtin. Jibervê yeka hanê jî ve impiryalizma Emerîkî hemû hêz û hinerên xwe di Rojhilata Navînî de ji bona nava kar dane biavêtin, da ku ew vê peymana 1ı avdara sala 1970 mêjûyî di 190Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

jîna gelê Iraqê de û herwehajî di mêjûwa Rojhilata Navînî de bidin birûxandin.

Şovînizma Erebî bi carekê ve bi çarekirineke aşîtî û demokrasî

ve ji bona pirsa Kurd li Kurdistana Iraqê de pê nedidatin bipêrûniştin û hêjîbêtir pê nedidatin bibawerîkirin. Wan her û her ji xwe re didatin bikarkirin, ku ew wê bi darê zorê ve di rêya leşkerî de bi ceng û şer ve bide biçarekirin; hêjîbêtir wê didate bixwestin, ku ew bi şer û cengê ve xebata gelê Kurd bi carekê ve bide bişikenadin û di encamê dawî de wê bide bitarûmarkirin û Kurdistanê bide bierebkirin.

Evaya bi xewin û nigaşa Erebên rehperest ve di sedsalê bîstan de, di sedsalê şiyarbûna miletan de, di sedsalê herifandina kolonyalizmê, impiryalizmê û serdarîkirina bêgane de ji bona çarekirina pirsa Kurd, Israila Duwem dihate biderkevtin. Belê di nava van remanên hanê de bes û bi tenha ve him ji bona Kurd û himjî hêjibêtir di encamê dawî de ji bona miletê Ereb de wêranîkirin û destanên gewreyî mezin dê bêtin biderkevtin, Ku di nava wan destanên gewreyî mezin de dê miletê Ereb bi deha bêtir ve tûşî şikestinê, wêranîyê û kevtinê ve bête bikirin.

Serpêhatîya dewleta Emewî bi baştirîn nimûne ve têtе biderkevtin, ku piştî nêzîka ji 132 salan ji serdarikirina Ereb de di rêya Abasîyan de û bi piştgima Farisan û Kurdan ve serdarîya Emewî di Rojhilat de hate birûxandin. Di encamê dawî jî de him Farisan di rêya Furskirina Musilmantîyê de di pêla Sefewîyan de di sedsalên panzdehan de û him ji wergirtina Turkan Xilafeta Musulmantîyi Ereb de bi navê Musulmantîyê ve di destpêka sedsalê şanzdehan de miletê Ereb tûşî gewretirin destanê hate bikirin û ew ji sala 1515 tanî 1918 ji bona jêrdestîya Turkan de hate bikevtin û gewretirîn destanên demê -bi serê wî ve hatin bikevtin û ew di nava perîşanî û paşkevtinê de dihate bijîyandin û bi sedan sal ve ji pêşkevtina Merovanîyê de hate bipaşkevtin.

Merov dikare li vê derê de bi sedan nimûne ve ji mêjûwa

tevaya miletan de ji bona rehperestên Ereb de bide bianîn, ku bê kanî çi bi serên wan miltan ve hate bikevtin, ji yên ku wan jî bi beramber miletên jêrdestên xwe ve remanên wetovî regezperestî didatin bikaranîn.

191

Her miletêk divê ew bi xwe ve xwe ji serpehatîyên mêjûwa xwe û herwehajî ji serpêhatîyêrı mêjûwa miletên din de bide bifêrkirin, da ku ew xwe ji destanên giranî mêjûwê de bide biparastin; jiber ku Merov û herwehajî Milet di vê jînê de mêjûwa xwe bi destên xwe ve didin bidurustkirin. Bextxweşî û bextreşiya Merov û Miletan di encamê dawî de bi destên wan ve tête biderkevtin. Çi gava ku Merov û Milet di vê rastîya hanê de hatin biliberkevtin, wê çaxê ew dikarin pir derd û kulên xwe di vê jînê de bidin bikêmkirin û bextyarîyê û pêşkevtinê ji xwe re di vê jîna hanê de bidin bigeşkirin û bigirawkirin. Di 21 befirbara sala 1922 de bi dazanînekê ve bi hevreyî ve ji bal Şanda Serdariya Ingilizî û Şanda Rêjima Bagdadê de bi şêveyekî mîrî ve ji bona Hevgirêdana Netewan de bi pêrûniştirıa mafeyê Ewtonomî ji bona Kurdistana Jêrî ve dihate biderkevtin. Evaya bi deqa wê dazanîna hanê ve bi zimanê Ingilizî ve tête biderkevtin û ew wetovjî ji bona Hevgiradana Netewan de hatîye bipêşkeşkirin: "The Govemment of His Birtanic Majesty and the Govenrment of Iraq recoqnize, to establish a Kurdish Government within these Frontiers. They hope that the different Kurdish groupe will arrive as soon as possible at an arrange among them on the form they desire for this govemment and limits with in which they would like it to extend. They will send respomsible delegates to discuss their economic and political relations with the Govemment of his Majesty and the Government of Iraq" -Serdarîya Padişahîya Biritanî û serdariya Iraqê bi mafeyê Kurd

ve di nava sînorên Iraqê de têtin birûniştin, ku ew ji xwe re di nava wan sînoran de serdarîyeke Kurdî bidin bidurustkirin. Ew didin bihêvîkirin, ku dê gurûhên cudan ji Kurdan bi lez û bez ve di nava xwe de bi lihevhatinekê ve li ser daxwaza xwe de ji bona rengê vê serdariya hanê û danîna sînorên wêna de bêtin bigihandin. Herwehajî divê ku ew Wênerên xweyî Berpirsiyar ji bona gift û gokirinê ve li ser pêwendîyên wanî abûrî û siyasî de ligel serdarîya Padîşahiyê de û ligel serdarîya Iraqî de bidin binardin-

Herwehajî di 24. 12. ı924 A Stament by the Biritish High Commssioer "recogneizing the right of the Kurdish living within the frontİers of Iraq to establish a Kurdish Gevernment inside these frontiers" -ji bal Serpereştvanê Ingilizîyi Bilind ve li Iraqê de ev ragihandina hanê hate bidan: -Pêrûniştin bi mafeyê Kurdên Jîndar ve 192Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

di nava sinorên Iraqê de, ku ew serdarîyeke Kurdî ji xwe re di nava wî sînorê hanê de bidin bidurustkirin.-

Ev jî Igilizan jiber çarekirina Musilê û rakişandina Kurdan bi ser xwe ve date bikirin. Merov li vêderê de û di vi warê hanê de pir li ser belgeyên Ingilizî de dikare bide biavixtin, jiber ku ew birastî jî ve pir hatine binivîsandin û hêjîbêtir ew pir bi nerx ve him ji bona têgihiştina siyaseta dewleta Ingilizî de li ser pirsa Kurd û durustkirina dewleta Iraqê de tête biderkevtin û heryek ji wan belgeyên Ingiliizî jêre taybetîyeke mêjûyî him ji bona Kurd û him jî ji bona Ereb tête biderkevtin. Xwendekarîya wan bi wirdî ve bi pêwsit ve li ser Rewşenbîrên Kurd tête biderkevtin. Jibervêjî bi başî ve tête bidîtin, ku ew belgeyên hanê bi hev re bêtin bixwendin û li ser wan de bête bixwendekarîkin.

Li vê dere jî de em bes û bi tenha ve dixwazin bê ka çi li ser

pirsa Musilê de ji bal Mohemed Emîn Zekî Beg de di mêjûwa Kurd û Kurdistan de bergê yekem de di rûplê 153 de ji destnivîsa wergerandina kurmancî de ji xwe re dayite binivîsandin, da ku ji xwe re rehperestên Ereb bêtir him di cewhera pirsê de û himjî di metirsîya neçarkirina wê de di ayinde de bi baştir ve bêtin biliberkevtin, gava ku ew vê ligel peymana sala1515 de bi hev re bidin biberamberkirin; jiber ku Turkan hêjî pirsa Musilê ji xwe re di nava serê xwe de nedane bijibîrkirin û av û girêz ji devên wan, mîna ku ev av û girêz ji devên ıngilizan û Firensan di dema xwe de ji pêla peymana Sayks-Piko de ji sala 1916 de li ser nefta Kurdistanê de dihate biherikandin û jibervêjî ve û li ser vêjî de wan Kurdistan dane bi sê perçekirin û du perçe jê bi darê zorê ve bi ser Iraqê û Surî ve dane bivekirin, him li ser nefta Kurdistanê de û himjî li ser ava Kurdistanê de tête biherikandin.
Çawan neft bi hoyê parvekirina Kurdistanê ve di piştî cenga cihanî yekem de bi careke din ve piştî paravekirina çildêran de dersala 1514de hate biderkevtin, weha dê neft û ava Kurdistanê bi hoyên yekkirina wê ve di encamê dawî de bi neçarî ve bêtin biderkevtin.
.Pirsiyarîya Musilê"
61Ji xwe re bi dûr û dirêjî ve li ser vê pirsa hanê de û tevaya belge û pilanên siyaseta dewleta Turkî di vî warê hanê de di nivîsta pir hêja de li ser pirsa Kurd de bi zimanê Elmanî ve di bin navnîşana: ,,Kurdistan zwischen Aufstand und Völker Mord- "
193
Pirsiyarîya Kurd bi tenha ve bi ser welatê Musilê ve hate bivegivaştin, Ku ew bi kê ve bête bigirêdan, divabû ew ji bal Hevgirêdana Netewan de bihata binîşankirin.

Di dawî de Hevgirêdana Netewan ji bona lêgerandinê li daxwazên Ingilîzî, Turkî û Pirsyarîkirina Arezoyî Xelkê wê de bi pêkanîn û binardina Encûmenekî lêgerandinê di 30 kewçêrîka sala ı924 de date bibiryarîkirin.

Civata Hevgirêdanê di] 3 çêrya duwem de di sala ı924 de ev Encumena hanê date bipêkxistin. Ev pêkhatina hanê ji Peyayekî Gewreyî Meceristanê Kont Tîlîki, ji Siwêdê Misyo F. Wîrson û Kolonêl Bolis ji sipahê Belçîkî ve hate bipêkhatin.

Evan li dawîya çavpêketina wan de ligel dewleta Ingilîzî û Turk de di ı6 rêbenda sala ı925 de bi Bexdê ve hatin bigihaştin. Herwehajî Wênerê Turk jî ligel wan de bû. Li Bexdadê Wênerekî dewleta Îraqê jî tev li wan bû. Ew tev de ji bona lêgerandinê ji bona welatê Musilê û hemû cîgehekî geryan. Li dawîya bidawîanîna Karmendîya xwe de ew vegeriyan û di 16. tîrmeha sala 1925 de Raportekî dûr û dirêj ji bona Civata Hevgirêdana Netewan dane

Kurdistan di navbera sehildanê û Qirkirinê de-, r. 17 - 31, Edittion Komkar,

Frankfurt am Main 1991 bidin bitemaşekirin. Di vî beşe hanê de li ser siyaseta

Dewleta Turkî de beramber bi Wilayeta musilê ve tête binivsandin û tevaya

belgeyên wê siyasetê dide bitomarkirin. Herwehajî di nava van rûpelên hanê de ev

navnîşana hanê jî li ser bingehê pirsa Musilê de tête binivîsandin: "Kurdistan vor der

Neuauvteilung oder eine gerechte Lösung der Kurden Frage" Magelo Kurdistan li

ber parvekirineke nuh ve tête biderkevtin, yanjî magelo dê çarekirineke dadwerî ji
bona Pirsa Kurd de bête bidîtin.
'Ez naxwazim li ser vê pirsa hanê de di neha de bidim biaxivtin; jiber ku neha pir li ser vê pirşa hanê de tête binivîsandin û ew bi rastî jî ve di neha de û
herwehajî di ayinde de dê roleke pir germ û giran bide bilîştin. Ez dê li lêgerarıdina
Ev nivîsta hanê bi belgeyekî mêjûyîyî pir bi nerx û hêja ve li ser mêjûwa Kurd û Kurdistanê ve tête biderkevtin.

218Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

Di herifandina Seltena Osmani de der sala 1918 de û di kongirê Sever de der sala 1920 de di bendên taybetîyî girêdayî bi Kurdistanê ve benda 62, 63 û 64 pir bi başî ve li mafeyê Kurd de di Kurdistanê de hate bitemaşekirin û ew li ser 14 bendên Wilson Serokê Yekgirtina Dewletên Emerîkî de di çarekirina çarenûsa netewan de hate biçarekirin.
Pirsa Musilê di sala 1925 û herwehajî pêrejî pirsa neftê li Kerkûkê de hate biderkevtin, ku Ingilistanê bi her awyekî ve bi destxistina Nefta Kurdistanê ve bi giringtirîn berjewendîya xwe ve date bixwestin. Kurd di lêpirskirina milî de ji bala Girêdana Netewan de bi Eşkere ve datin bixwestin, ku ew dixwazin bi dewlet bin û heger ku ev neyête bikirin, ew dixwazin ligel dewleta Turkîyê de bêtin biderkevtin û ew naxwazin, ku ew bi tev li dewleta Iraqê de bêtin bikirin.
Dewleta Ingilîzî û herwehajî dewleta Iraqî sozên Ewtonomî ji bona Kurdistanê di salên 1922 û 1924 de beramberî bi tevaya dunyayê ve daiıe bidan. Belam dewleta Iraqê ew sozên hanê bi carekê ve dane bijibîrakirin.
Kurdan ji wê rôjê de ji bona mafeyên xwe li Kurdistana Iraqê serhildanek li dû yan din de dane bikirin, belam ew di tevaya wan serhildanên xwe de nehatin biserkevtin, ne ku dewleta Iraqê xurt bû, lêbelê her û her ew ji bal Impiryalîya Ingilîzî de bi dijî Kurd ve dihate bipiştgirtin.
Hêvîyeke mezin ji bona Kurd li Kurdistana Iraqê de hate

biderkevtin, gava ku şûreşa demokrasîyî 14 tîrmeha sala 1958 hate bivêkevtin. Tevaya miletê Iraqê û herweha jî tevaya bîr û bawerîya cihanê bi vê şûreşa pîroz ve hatin bidilşadkirin, ku têde Ereb û Kurd bi Beşdar ve di nava welêt de bi mîrî ve dihatin biderkevtin. Barzanî piştî mayîna sêzdeh salan ji Sovyêtê ji bona Iraqê hate bivegerandin û xwe bi nala Serbazekî ve him ji bona Abdul-Kerîm Qasîm û himjî ji bona liberxwedana vê şûreşa demokrasîyî piroz date bidanin.
Belam pir pê neçû, Ebdulkerîm Qasim ji rêya şûreşê hate biderkevtin û wî xwe bi diktatorekî bê hempa ve li ser miletê Iraqê de dixwest bide bidanîn. Wî dest bi şerê miletê Kurd ve di 11. 9. 196 I date bikirin. Dî encamê vî şerê hanê de pir kes hatin bikuştin û di dawî dawî de di 8. 2 1963 de Abdul-Kerîm Qasim jî hate birûxandin ûji wê 219
rojê de û tanî neha de milîyên Erebî faşî bi hemû karînên xwe ve ji bona erebkirina Kurdistanê û qirkirina miletê me bi hemû çekên xweyî dujehî ve bi napalm û Fosfor ve didin bişerkirin, ku tanî neha bêtir ji 000 70Kes ji Zarok, Pîrek, Kal û Rebenên Kurdên bi bê çek ve li ser destên Şovînîyên Ereb de di Kurdistanê de hatine bikuştin û bêtir ji 2000gund ji 5000 gundên Kurdan hatine bikavil û biwêrankirin. .
Herwehajî bêtir ji Milyardeke Dolar di vî şer û vê cenga qirkirina miletê Kurd de wêrankirina kurdistana Iraqê de li ser serdarîyên kevneperestîyên û şovînîyên Ereb de hatîye birawestandin.
Bes û bi tenha ve ev şer û cengên hanê ji bona erebkirina Kurdistanê, talankirina 90 Melyon neft ve ji Kerkûkê de ji 15. 10. 1927de û qirkirina milête Kurd tête biderkevtin. Weha bi hovberî ve sipahê Rehperestên Erebîyî Ef1eqî bi mîna Spanya û Pirtula ve li Emerîka de beramberî Hinodên Sor de ligel Kurd de di nava welatê wîyî Kurdistanê de ji bona qirkirina miletê Kurd de didin bişerkirin;

jiber ku Kurd daxwaza Demokrasîyê ji bona Iraqê û Ewtonomîyê ji bona Kurdistanê didin bikirin
Hêvîya miletê me û daxwaza wî ji we Endamên hêjayî bi rêz ve tête biderkevtin, ku hûn dengê xwe ji bona rawestandina vî şerê qirkirinê beramber bi miletê Kurd ve li Kurdistana Iraqê de bidin biberzkirin û ji serdarîya Iraqê bidin-bixwestin, ku ew vê pirsa rewayî hanê li ser bingehê demokrasîyê û ewtonomî de ji bona Kurd di Kurdistana Iraqê de bide biçarekirin; jiber ku neçarekirina vê pirsa hanê metirsîyeke mezin li ser asayîşê, aramîyê û aştîyê de di Rojhilata Navînî de dide bidurustkirinû herwehajî hêjîbêtir çarekirina pirsa Kurd bi şêveyekî demokrasî ve li ser bingehê Demokratî ji bona Iraqê û Ewtonomî ji bona Kurdistanê bi carekê ve têde berjewenndîya miletê Iraqê bi Ereb û Kurd ve tête biderkevtin û ew bingehê dostanîyî ji dêlva dujminatîyê ve di navbera miletên Kurd û Ereb de dide bidurustkirin.
Bi van navrokên hanê ve û di çarçopê van remanên hanê de ez li ser pirsa Kurd û çarekirina wêna de di Kurdistana Iraqê de dihatim biaxivtin. Diyar bû, ku ev şêveyê lênerîna min ji bona çarekirina pirsa Kurd bi dilên Beşdaran ve dihate biderkevtin. Hêjî min gotina sipasîya xwe ji bona guhdrîkirina Beşdaran ve nedabû bidawîkirin, Mukerem

Talebanî û Wênerî Surî vitevit bi wan ve hate bikevtin û wan herduwan bi hev re destên xwe ber bi tepê Serpereştîyê ve didatin bidirêjkirin û bi şipyayî ve dihatin birawestandin û wan herduwan bi her ver didatin biqîjkirin, ku ew dixwazin bidin biaxivtin. Ew pir bi lez û bez ve dihatin biderkevtin, da ku ew li ser gotinên min de bidin biaxivtin.
Belê ev jî bi mafeyên wan ve dihate biderkevtin, lê divabû ku

ew çavdêrîya hatîna dema navê xwe û peyva xwe bidin bikirin. Belam diyar bû, ku sewda û hiş ji serên wan de hatibû bihilanîn. Ew herdu pir bi naşîrîn ve bi qîreqîra xwe ve ji bona bi lezbûna peyvê ve di wê civatê de dihatin biderkevtin. Belê bîr û baweri nayête biveşartin û bêhnekê piçekî kêm yanjî zû tu tiştê li gorê de û li rastê de nade biveguhertin.

Xalid Muhyedin bi ser xwe ve hate birabûn wî pir bi nermî ve ji wan re date bixwestin, ku ew ji fermûwa xwe bêtin birûniştin. Ew herdu hatin birûniştin. Xalid date bigotrin, belê hûn dikarin bi dûr û dirêjî ve li ser peyva Wênerê Kurd û bîr û baweriyên wî de bidin biaxivtin, dema me heye û wî rêya peyvê di pêşî de ji bona Mukerem Talebanî date bidan.

Mukerem Talebanî di pêşî de date bi gotin, ku ez li vê derê de dixwazim vê rastîyê bidim bigotin, ku ev Merovê hanê ne bi Wênerê Kurd ve tête biderkevtin, ew bes û bi tenha ve bi Wênerê Serokên Eşîran ve, bi Wênerê Kevneperestan û Cihêvanan ve tête biderkevtin, Kurt ew bi Wênerê Partîya Demokratî Kurdistan ve tête biderkevtin, ya ku ew tevaya kevneperestîyê Û Derebegîyê li Şemalî Iraqê de dide biwênerkirin. Pir ji Kurdên Pêşverû û Welatperwer û herwehajî ji Damizirvanên Partîya Demokratî Kurdistan neha ew ligel serdariya milîyî pêşverû de mil bi mil ve bi dijî Serokên Eşîrên Kevneperest û Cihêvanên Kurd ve Nokerên Impiryalîyê û Kevneperestî di Rojhilata Navînî de didin bixebatkirin û bişerkirin. Serdariya Iraqêyî Milîyî Pêşverû rojekê bi dijî birayên Kurd ve di Şemalî Iraqê de nedaye bişerkirin. Gotinên vî Merovê hanê bes û bi tenha ve li qazanca Kevneperestîyê û Impiryalizmê têtin biderkevtin.

Herwehajî ew bi dûr û dirêj ve li ser wan pêrabûnên avanîyê û bidestkevtinên Kurd de ji bal serdariya miliyî pêşverû de hate

biaxivtin.
221
Vî hestîkôjê Basîyî hanê xwe didate bijibîrakirin, ku Partîya Komonistî Iarqê û herwehajî Demokratên Ereb ligel Kurdan de di Kurdistana Iraqê de ji man û nemanê dihatin biparastin û wan bi dijî vê serdarîya rehperest ve ji bona demokratîyê ji bona Iraqê û Ewtonomî ji bona Kurdistanê didatin bixebatkirin û bişerkirin. Bi kurtî ve û hêjibêtir bi kurmancî ve wî wetov didate bigotin:
Hemed û sena bo Xwedayî Alemîn ev Xwedayê daye me ev Basên Mobîn78
Piştî bi dawîhatina gotina Mukerem Talebanî ve Wênerê Surîyî Basî bi can û dilê xwe ve çavên xwe date bigirtin û wî devê xwe date bivekirin: Mîna ku bi bîra min ve tête biderkevtin ev Basîyê Surîyî Manalê bê derpî li ser van xalên hatî de date biaxivtin:
Kurd bi Miletekî ve ne li Surî û nejî li iraqê de nayêtin biderkevtin.
Ew bi kemîyeke milîyî barkirî ve ji bona nava xakê welatê Ereb hatine bibarkirin.
Kurdistan bi Welatê Kurd ve ne li Surî û nejî li Iaqrê de tête biderkevtin.
Pirsek kujêre dibêjin pirsa kurd niye", ev pirsa hanê bes û bi tenha ve ji bal Sehyoniszmê, Ipiryalizimê û kevneperestîyê de hatîye bidursutkirin, da ku ew gewdakî bêgane di nava welatê Ereb de ji Zerî tanî Kendava Erebî bidin bidurustkirin. Evê neha li Şemalî Iraqê de şerdikin, ew bi Nokerên Sehyonizmê, Impiryalizmê û Kevneperestîyê ve têtin biderkevtin, mîna ku birayê Mukerem Talebanî ev bi eşkere û

78Ev Malika hanê ji destpêka Nivîşta Zayîna Pêxember ve tête biderkevtin, mîna ku

bi bîra min ve tête biderkevtin, ku ew nivista hanê ji bal Melayê Botî de hatîye
binivîsandin û wetov ew malika hate tête bidestpêkirin:
Hemd û sena bo Xwedayê Alemîn ev Xwedayê daye me ev dînê Mobîn
79Ji xwe re li ser pirsa Kur de li namilka wergerandî de ji bona Kurdî zaravayê
soranî de ji bal Seed Ebdulah de bidin bitemaşekirin, ya ku bi derîkî ve ji nivîsta
Lazerêv tête biderkevtin. Ew nivîsta hanê, ya ku ew li jêr navnîşana:" Pirsa Miletan
di nava Welatên rizgarîkirî de di Rijhilat de" tête biditin, bi zimanê rusî ve li Moskê
de di sala ı986 de hatîye bibelavkirin. Ev namilka wergerandîyî hanê di bin vê nav
û nîşanê de "Ew hokaraney meseley Kurd pêkdênin"-Hokarîyên pirsa Kurd didin
bipêkanîn- bi Kurdî ve bi zaravayê soranî ve hatîye biçapkirin. Li ser vê namilka
hanê de ne dem û nejî cîhê çapê hatîye binîvîsandin.
222Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
diyar ve date bixuyanîkirin. Sipahê Iraqêyî Erebî bes û bi tenha ve
dide bixwestin, ku ew wan bîrîkên Sehyonizmê, Impiryalizmê û
Kevneprestîyê bidin binabudkirin.
Miletê Erebîyî mezin ji Zerî tanî kendava Erebî dê vî xakê
Erebî perest ji her destdirêjîyekê bide biparastin û dê ew destên
destdirêjan bide bijêkirin.
Pir gotinên din di ferhenga Basîyên Ef1eqîyî faşî de vî Sêwîyê bêderpê
û pêxwas ji xwe re bi dijî Kurd ve didate bigotin.

Piştî van gotinên vî Basîyê Surî Xalid Muhyedîn dest bi peyvê ve date bikirin û wetov bi kurtî ve ez dikarim gotinên wî bidim biderxistin:

Ez pir sipasî Wenerê Kurd li ser wan gotinên wîyî bi nerx ve didim bikirin. Çend ez ji sipasîyan ji bona Wênerê Kurd didim bipêkekirin, weha deha ez turebûna xwe li ser peyvên Mukerem Talebanî û Wênerê Surî didim biderxistin, ku ew ne bes tenê bi şermezarî ve ji bona herdu wan tête biderkevtin, lêbelê hêjîbêtir ew pir bi şermezarî ve ji bona hemû miletê Ereb ve tête biderkevtin, gava ku ew wisa ligel çarekirina pirsa miletê Kurd de didin bireftarîkirin û ev jî divê li vêderê de bête bigotin:

Miletê Kurd ji miletên Kevnarî Rojhilata Navînî tête biderkevtin û ew bi hezaran sal ve di nava Welatê xwe de di Kurdistanê de tête bijîyandin û ew neha di nava Turkî, Iran, Iraq û Surî de tête biparvekirin."

80Ji xwe re li ser Mêjûwa Kurdistanê û rûdanên wê de di piştî cenga cîhanîyî yekem de bi dûr û dirêjî ve li nivîsta pir hêja û bi nerx ve bi zimanê Kurdî ve ji bal Hesen Hişyar de di bin navûnîşana "Dîtin û Bîrhatinên min ı907 - ı985" de, çapxana Emîral, Beyrût, Libnan ı993 bidin bitemaşekirin.

Ev nivîsta hanê yekek ji nerxtirîn nivîstên zimanê Kurdî bi zaravayê kurmancî ve li ser rûdanên wê demê de tête biderkevtin; jiber ku Hesen Hişyar bi kamasekî mêjûwa miletê xwe ve dihate biderkevtin û ew di şûreşa Şêx Seidê Pîran de bi pir jêhatîbûn û bi têde bibeşdar ve dihate biderkevtin û ew bi Yawirê Şêx Seid ve di şûreşê de dihate biderkevtin. Wî di tevaya jîna xwe de ji bona welat û miletê xwe bi dilsozî ve her û her bi

welatperwerî ve di bin pir merc û zînetên dijwar de didate bixebatkirin. Herwehajî wî bi hemû tuwana xwe jî ve pişta şûreşa Kurdistana Iraqê 223

Mafeyê miletê Kurd mîna mafeyê hemû miletên din di vê dunyayê de ji bona çarenûsa xwe de tête biderkevtin û daxwaza miletê Kurd li Kurdistana Iraqê de: Demokrasî ji bona Iraqê û Ewtonomî ji bona Kurdistanê pir bi rewa ve û di cihê xwe de tête biderkevtin. Divê bi wan daxwazên hanê ve bête birûniştîn. Sipahê Iraqî bi beramberî miletê kurd ve di Kurdistana Iraqê de bi sipahekî dir û hov ve tête biderkevtin.

Hîç Ereb nikarin tu hêvîyê û tu dawxazîyê ji bona piştgirina miletê Felestîn û piştgirtina xwe ji hîç miletekî bidin bikirin, tanî ku ew pirsa miletê Kurd li ser bingehê çarûsa miletan de nedin biçarekirin û bi mafeyê miletê Kurdî rewa ve neyêtin birûniştin.

Gotinên Mukerem Talebanî û Wênerê Surî bi bîra min ve reweşta Gencên Turkî Nuhhatî ji bona turkkirina Ereban di piştî Şûreşa Medhet Paşa de der sala 1908 de didin bibîrxistin, yên ku wan di encamê dawî de bi lezkirina rûxandina Seltena Osmanî ve der sala 1918de datin bilezkirin û wan ziyaneke mezintir ji herkesekî bêtir bi Turkan û Seltena Osamnî ve datin bigihandin. Wetov jî ev gotin û reftarên Milîyên Erebîyî şovînî di encamê dawî de bi erebkirina Kurd û Kurdistanê ve dê ziyanên wan li ser Iraqê û Surî de ne bi kêmtir ve ji ziyanên Cengên Turkî de li ser Selteneta Osmanî de bêtin biderkevtin. Ez ji dil û can hêvîdarim, ku dê miletê Ereb her û her bide bixebatkirin, da ku ew miletê Kurd di Kurdistanê de bi Dostên xwe ve, bi Birayên xwe ve bide bikirin û ne ku ew bi darê zorê ve li ser siyaseta milîyî şovînî de vî miletê mêrxas û gerans lawên Selah El Dinê Eyûbî bi dujminên xwe ve bidin bikirin; divê Ereb jiber

qehremanî û Qencîya Selah El-Dinê Eyûbî de bidin bişermkirin, heger ku Selah El-Dinê Eyubî neba, dê şerên Xaçperestan di dusedsalên xwe de welatên Ereb bidana bizeftkirin û dê nala Hinodên Sor li Emerîka de der sala ı492 de bi ser serên Ereban ve bihata bikirin.
Piştî Ku Xalid Muhyedîn peyva xwe date bidawîkirin. Pîra Irlendî destê xwe date bibilindkirin, ya me ew di civîna pêşî de di didate bigirtin û ew bi dilsozê Barzanîyê mezinî ne mir ve dihate biderkevtin.
224Li ser rêya azadîya Kurdistanê de bezim û rezma Basî û Mukerem Talebanî de ligel Wênera Emerîkî de dabû binisakirin. Wê pir ji me didate bihezkirin û ji dil û can pişta pirsa Kurd di Kurdistanê de didate bipitgirtin. Wê em bi gelek Wênerên welatan ve li Ewropa û Emerîka Latînî û Keneda de bi nala Wênerên Kurd ve di Kurdistanê de didatin binaskirin û wê ji wan daxaza pişgirtina me didate bixwestin.
Gava ku em ji bona nava hola Encumena Rojhilata Navînî hatin biçûyîn, wê bi milên min ve date bi girtin û ez di nava xwe û Wênera Emerîkî de datim bidanîn. Gava ku min gotina xwe date bidawîkirin û ez hatim birûniştin, wê pîrê bi hêdî ve ji min re date bigotin: Şêrinê ber dilê min, te başkir, ya te bes û yê mayî tu ji Pîra xwe re bide bihiştin.
Bi rastî jî ve Pîra min ne pîr bû. Gava ku ew bi ser xwe ve hate birabûn, tê bigota ku evaya bi keçeke çardeh salî ve di vîna xwe de ji bona Kurd dihate biderkevtin û wê, mîna ku bi bîra min ve tête biderkevtin, wetov wê date bigotin:
Ez di nava gelek kongiran de çi netewî û çi jî di navnetewî de hatime bibeşdarîkirin, belam wetov bi xavî ve mîna gotinên Wênerên Serdarîyên Basî li Iraqê û Surî de min hêjî beramber pirsa miletekî

nedayite bibihîstin.
Wênerê miletê Kurd bi amar û belge ve li ser pirsa Kurdistanê de date baxivtin, min nedate bibihîstin, ku yekekî ji wênerên wan serdarîyan amar û belge bi nerastî ve dane biderxsitin; lêbelê bes û bi tenha ve bi gotinên hîç û pûç ve wan bersîva Wênerê Miletê Kurd datin bidan.
Pirsa miletê Kurd ji bona mafeyê çarenûsa wîna bi hîç mercekî ve, yanjî bi hîç desteyekî ve, bi guruhekî ve û yanjî bi hîç çînîyekê ve nayête bigirêdan. Ev mafeyê hanê bi mafeyekî seruştî ve ji bona hemû miletan di vê dunyayê de tête biderkevtin.
Mukerem Talebanî dide bigotin; ku ev .Wênerê hanê ne bi Wênerê Kurd ve tête biderkevtin, lêbelê bi wênerê Kevneperestîyê, Serokên eşîran ve tête biderkevtin. Vî Wêmerê Miletê Kurd Demokrasî ji bona Iraqê û Ewtonomî ji bona Kurdistanê date bidaxwazkirin. Wî çarekirina pirsa miletê kurd bi aşîtî ve date bidaxwazkirin. Wî ji me re tevaya derdên miletê xwe date biderxistin û ji bona bextê me date bibangkirin, ku em pişta vî Miletê Kurd ji

qirkirinê Û wêranîkirinê de bidin bigirtin. Ev bi daxwaza Wênerê Kurd ve dihate biderkevtin.Talanî û wêrankirina Kurdistanê û qirkirina Kurd ji bal serdarîya Iraqê de ji bal Wênerê serdarîya Basî Mukerem Talebanî de dihate biderkevtin. Cudabûn di nava van herduan de yek jê wênerîya Miletê xwe dide bikirin û yê din jî bi navê Pêşverûtîyê ve rast û durust wênerîya serdarîya Basîyî rehperest dide bikirin, ku hêjî di nava guhên min de nalîna serbirîna bi hezaran ve ji Demokratên Iraqê ve li ser destên faşiyên Basî de der sala 1963 de tête biderkevtin. Wêne rê Basîyê Surî Kurd bi miletekî ve nade bidanîn. Ez zarobûm di mêjûwê de her û her navê Selah El-Dinê Mezin (1134-

(1193ji mere di şerê Xacperestan de di sedsalên duwazdehan de dihate bigotin, ku vî Gewreyê Kurd Patişahê Ingilizî Richard (1 157-(1189dayite bidîlkirin û wî ew di dawî de date biberdan. Herwehajî vî gewreyê Kurd der sala 1ı97 bi girtina Qudsê ve şerê Xaçperestan piştî dirêjbûna bi dusedsalî ve hate bidawîkirin, Herwehajî navê Kurd û welatê wîna ji bil belgeyên Sornerî de herwehajî ew di Tewratê û Incîlê jî de hatîye bitomrkirin.

Der sala 1918 Wilson (1856 - 1924) Serokê Yekîtîya Dewletên Emerîkî 14 bendên bingehî di bernama xwe de ji bona çarekirina pirsa Aşîtîyê di çarenûsa miletan de date binivvîsandin. Wî ji bona çarekirin pirsa miletên li jêr Selteneta Osmanî de di pêşî de ew li ser navê Ermenîya de, di pişt re ew li ser navê Kurdistanê de û di piştî re ew li ser navê Arebistanê de dide biaxivtin. Di peymana Sever der sala 1920 de di bendên 62, 63, 64 li ser pêkhatina dewleteke Kurd de tête biaxivtin, berî ku him li ser pêkhatina dewletekî Surî yanjî Iraqî de bête biaxivtin. Heger Merov neha ji xwe re li hemû neqşên berî cenga cîhanî yekem de bidin bitemaşekirin, dê em ji xwe re neqşa Kurdistanê' li ser wan neqşan de bidin bidîtin. Gelo Sehyonizmê, Impiryalizmê û Kevneperestîyê pirsa vî miletê kevnar di nava welatê wîyî Kurdistanê de ji berî bêtir ji pênc hezar sal ve dayite biafirandin? Ez gûmandikim, dê Basîyê Wênerî Surî bi çend hezar sal ve bi qerzdar ve bête biderkevtin; jiber ku Herz Theodor, yê ku wî tevgera Sehyonizmê dayite bidanîn, ew der sala ı860 hatîye bizayîn û ew der sala 1904 226Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
hatîye bimirin û Impiryalizim di dawî sedsalê Nozdehan de hatîyê bipêkhatin."'

Wetov tête biderkevtin, ku ne Wênerên serdarîyên Basîyên Surî û Iraqî bi rastî ve nizanim bê ka ew çi dibêjin. Heger ku ew

dixwazin me bi van gotinên xweyî şovînî û rehperestî ve bidin bixapandin, ez gûmandikim, kes bi van pêyvên ne rast ve nayêtin bixapandin, lêbelê ew dikarin bes û bi tenha ve xwe bidin bixapandin. Di siyasetê de kî vê bide bikirin, di encamê dawî de bi ziyana wan ve tête bidawîkirin. Heger ku Ereb wetov bi vî çavê şovîrıî ve li çarekirina pirsa miletê Kurd de bide bitemaşekirin, hîç gûman têde nayête bidîtin, ku dê pir derd û kul bi ser serên miletê Kurd de bêtin bibarandin, lêbelê di dawîya dawî de dê pirsa Kurd û Kurdistanê pir bi dijwartir ve û bi girantir ve ji her pirseketir ve li ser Ereban de bête birawestandin. Ez ji dil û can hêvîdarim, ku dê miletê Ereb ne ji bona Kurd, lêbelê ji bona xwe bi çavekî dadwerî ve li çarekirin pirsa kurdistanê de bide bitemaşekirin. Serphatîya Ereb ligel Israil de pir bi dewlemend û azar ve di vî warê hanê de tête biderkevtin, Ereban bi hemû xavbûna xwe ve dixwestin, ku ew Cuhan ji bona nava derya sipî bidin biavêtin û di pêşîya van Erebên hîç û pûç de Basîyên Surî û Iraqî dihatin- biderkevtin. Wan bi van bîr û barîyên xwe ve bi vî karê xwe der 5 axlêva 1967 de Miletê Ereb tûşî gewretirîn şikestin di mêjûwa wî de dane bikirin û Dewleta Israilî li ser kîsê welatê Ereb de xwe date biducarîkirin. Belê dibe ku Basî xwe iro li Surî û Iraqê de beramber bi miletê Kurd ve bi xurt ve bidin bidîtin, belam sibehê dê pir bi pepûk û lawazî ve xwe bidin bidîtin, gava ku pişta vî miletê qehreman bête bigirtin û dê miletê Kurd di çarekirina mafeyê çarenûsa xwe de mîna hemû miletên vê dunyayê bête biserkevtin û bigihandin. Hemû wênerên din ji bil yê Cezarî de daxwaza çarekirina pirsa miletê Kurd li Kurdistana Iraqê de bi şêveyekî aşîtî û demokrasî ve
81Ji xwe re li ser pêkhatina Sehyonizmê û dewleta Israilî de bi dûr û dirêjî ve li
nivîsta .Jsrael Irıtern" de bi zimanê Elmanî ve, ji bal Ame Jörgensen de,

Militarverlag VEB, Berlin 1984 de bidin bitemaşekirin. Di vê nivista hanê de di
rupelê 39 I de hatîye binivisandin, ku dî sala 1897 de LÎbajarê Basel de iî Siwisra de
Kongirêyê yekemî Zehyonizmê ji bona damizirandina Rêxistina Sehyonizmî Cîhanê
hatîye bigirêdan.
227
datin bixwestin Û wan date bihêvîkirin, ku wetov mîna Mukerem Talebanî û Wênerê Surî li çarekirina pirsa Kurd de neyête bitemaşekirin,; jiber ku pê dê zêyaneke pir mezin bi miletê Ereb ve di encamê dawî de bête bikevtin.
Di dawî de ez careke din hatim biaxivtin. Min date bigotin: Ez we tevan li ser van gotinên we de derbarê miletê Kurd di Kurdistanê de û pêwistîya çarekirina pirsa wî bi şeveyekî aşîtî û demokrasî ve ji dil û can didim bisipasîkirin.
Piştî vê em hatin biderkevtin, Careke din Xalid Muhyedin bi destên min ve, bi destên Mukerem Talebanî ve date bigirtin û wî em ligel xwe de ji holê datin biderxistîn û pêrejî wî ji bona Wênerê Basî ji bona hatina nik me date bibangkirin. Piştî ku em herçar ligel hev de hatin bicivandin, careke din; belam vê carê pir bi tundtir ve wî ji wan re date bigotin: Ev siyaseta we dê bi gewretirin ziyan ve li ser miletê Ereb de bête biderkevtin. Her ku hûn Kurd bi laşekî biyanî ve di nava Xakê Ereb de bidin bidîtin û wî bi mîna Israila duwem ve bidin bidanîn, dê hûn bi gelekî ve ji Israil bêtir ji bona kara Israilê bidin bikarkirin. Heyf, ku hûn weha bi nezanî û xurayî ve miletekî wetov nala Kurd di Kurdistanê bi Dujminê xwe ve didin bikirin; jiber ku danîna miletê Kurd bi Israila duwem ve bi gelekî ve metirsîyekê li ser

miletê Ereb de ji Israila yekem de dide bidurustkirin. Ez ji we hêvîdikim, ku hûn dev ji van hîç û pûçîyan bidin biberdan û her û her ji bona dostaniya miletê Ereb ligel Kurdan de bidin bikarkirin.
Herduwan dixwestin, ku ew xwe zû ji nav destên Xalid Muhyedîn bidin birizgarîkirin; lêbelê min dixwest, ku ew bêtir ji bona van nezanên rebenên mêjûwê û Dujimên miletên xwe bide biaxivtin. Wan di bin çavan re li min de didatin bitemaşekirin. Çavên wan ne dibarî, ku ew li rûçikên min de bidin bitemaşekirin; belam ez rep û rast ne bi nala qilçixekî, ne bi nala dirêşekê, lêbelê bi nala gîsnekî ve di nîvêrı çavên wan de dihatim biderkevtin.
Piştî çuna herdu Basîyan min xatirê xwe ji Xalid Muhyedin date bixwestin û wî ez datim bihembêzkirin û ji min re date bigotin: Ez te li ser wan peyvên te didim bisipaskirin. Te pir bi rêk û pêkî ve li ser pirsa welat û miltê de xwe date biaxivtin. Te dilê min pir date bixweşkirin. Dêya min bi xwe jî ve ji Kurdên Kurdistana Turkî ji bajarê Diyarbekrê tête biderkevtin. Wê her û her bi Kurdî ve ligel me
228Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
de didate biaxivtin. Ez pir bi Xalên xweyî Kurd ve serbilindim. Hêviyeke min ji te heye, ew jî ku tu pir silavên min ji bona Qehremanê miletê Kurd Barzanî bide bigihandin. Hûn her biserkevtîbin.
Wetov nasîna min ligel Xalik Muheyedîn date bidetspêkirin û wehajî hate bidawîkirin. Min nema êtir ew Ciwanmêrê hanê Xwarzê Kurd date bidîtin.
Belam çîroka me ligel Mukerem Talebanî hêjî nehate bidawîkirin. Ez dixwazim dêrên dawî jî ji vê çîroka hanê li viderê de bidim bidawîkirin.
Di roja din de em hersê Wênerên Komela Xwendevanên Kurd

li Ewropa de ji bona geştekê li ser avên Berlin de di rêya keştekê de hatin bimêvandarîkirin. Em jî ji xwe re ligel hemû mêvanên din de ji bona wê seyranê hatin biçûyîn. Me ji xwe re keştîyek date bidîtin û em ji xwe re lê hatin bisuwarbûn û me cî ji xwe re têde date bigirtin. Me careke din date bidîtîn, ku Mukerem Talebanî mîna punga mar li ber pozê me de hate birûniştin.
Keçeke Elmanîyî Rojnernevan, ya ku me ew didate binaskirin, ji bona nik Mukerem Talebanî hate bihatin û wê ji wî çend pirs li ser serdarîya Iraqê jê date bikirin. Wî jî mîna hercar çi pesnê hebûn ji bona wê serdarêyê date bikirin û çi bedbûna hebû der barê Kurd û şureşa wî de date bigotin. Piştî ku Keça Rojnemevana Elamanî hevpyvîna xwe li nik wî de date bidawîkirin, wê berê xwe bi min ve date bivekirin û ji min date bipirskirin: Tu çî li ser van gotinên Mîrza Mukerem Talebanî dide bigotin: Mi jê re bi lez û bez ve date bigotin: Ku gotinên wî bes û bi tenha ve bi gotinên Xwefiroşekî ve têtin biderkevtin. Keçka Elmanî ji pozê şeytan hatibû bikevtin, bi zû ve hate pê biliberkevtin. Min jê re date bigotin: bersiva min ji bona te hate bitêrkirin. Wê ji min re pir bi ken ve date bigotin: Ez pir bi givaştî ve û hêjîbêtir pir bi gihaştî ve li ber bersiva te hatim bikevtin. Mukerem Talebanî li van gotinên meyî Elmanî de ne dihate biliberkevtin, lê ez gûmandikim, ku wî ew ji xwe re ji bal Wergerê pêre date biwergerandin.
Wetov bi vî rengê hanê ve çîroka me û Mukerem Talebanî di vî Kongirê hanê de pir kes li ser de hatin biagehdarîkirin. Piranîya Kurdên Komonist di Komelê de pir turebûna xwe li ser wan gotin û

reftarên Murekerem Talabenî de dadtin biderxistin Û wan jî ji dil Û can pişta helwesta me didatin bigirtin.
Raste duruste, ku helwesta Mukerem Talebanî ligel Basîyên

Surî û Iraqî de weha pir bi naşîrîn ve beramber bi miletê me ve dihatin biderkevtin, lêbelê di rastîya rastî de wan bi wan reftarên xweyî hîç û pûç ve pir kareke mezin di nava hemû wênerên Kongirê de ji bona miletê Kurd dane bikirin. Me zor sûd ji wê hîç û pûçbûna hanê ji xwe re ji bona ragiyandina doza miletê xweyî rewa bi tevaya Wenerên Kongirê ve date bigihandin. Wan pir baş li herdu alîyan de didatin biguhdarîkirin. Me dixwest, ku em pirsa Kurdistanê bi şêveyekî aşîtî, demokrasî li ser bîr û bawerîya cîhanê de bidin biraxistin û tevaya dadwerîya wê ji bona her Merovekî di vê dunyayê de bidin biderxistin. Ji alîyê din şovînizma Erebî dixest, ku ew her û her vê rastîyê li ser pirsa Kurd de bide bipo şandin û nehêle ku dengê vî miletê hanê ji bona mafeyên wî di çarenûsa wî de ji bona bîr û bawerîya cîhanê bête bigihandin. Em ji vî kongirê hanê bi serfirazî ve û bi serkevtî ve ji bona miletê xwe hatin biderkevtin.

Dara Tewfiq di wê gavê de li Mosko de dihate bidîtin û wî jî dixwest, ku ew ji bona wî kongirê hanê bête bihatin; belam piştî vê rezm û bezma me ligel Mukerem Talebanî de nema vîza pêhate bidan. Piştî bi dawî hatina vî kongirê hanê ve bi Dara Tewfîq ve viza pêhate bidan û ew ji bona nik me li Berlin de hate bihatin. Me jê re ji nû ve çîroka xwe ligel Mukerem Talebanî de di kongirê de date bigotin. Pir turebûna xwe li ser Mukerem Talebanî de date biderxistin û herwehajî pir kêfa wî bi wan jêhatîbûnên me ve hate biderkevtin. Belam wî ji me re date bigotin: neha ez hatim biliberkevtin, bê çîma ji bona min vîza nedidane bidan.

Hêjîbêtir di 1. 6. 1972 de serdarîya Iraqê Nefta xwe date .bimilîkirin, ya ku Sovyêtê hêvîyên mezin li ser de didatin biavakirin, ku dê ew wê bi Karnas û teknîkên xwe ve bidin biderxistin û dê ew wê ji bona cîhana bazara neftê bidin bigihandin,"

82Ji xwe re li kanîya Pêşî de r. 193 - 227 bidin bitemaşekirin.
230Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Sovyêt pir ji Barzanî didatin bihezkirin û rêz û pişt pir bi xurtî ve di seranserî mêjûwa xebata wî de lêdatin bigirtin. Lêbelê diyarîya Basîyan ji wan re bi girêdana vê peymana hanê bigir bi bênimû ve dihate biderkevtin û ew bi gelekî ve bi giringtir ve ji girêdana payman Sadat ve ji ber cihê siyasîyî Iraqêyî Sitratîcî ve dihate biderkevtin. Belê bi saya kêra Sovyêtê ve peymana ı ı avdara sala ı970 mêjûyî di nava Barzanî û serdarîya Iraqî de hate bigirêdan. Barzanî rast û durust ji Sovyêtê date bixwestin, ku ew wî ji nava devê gur bidin birizgarîkirin. Mebest jî ji vê li vêderê de di rizgarikirina wîna de ji nava devê gurê Iranî dihate biderkevtin.
Sovyêtê di piştî girêdana vê peymana hanê de pir di navbera Barzanî û serdarîya Iraqî de ji bona bicianîna peymana ı ı avdara sala 1970de datin bikarkirin. Wan baştirîn û bi nav û bangtirîn kesên xwe û gewretirîn Berpirsiyarên xwe ji bona çarekirina vê pirsê ji bona Iraqê didatin birêkirin. Bes û bi tenha ji bona nimû ne wan Girêcko Wezîrê Luberxwedana Sovyêtê, Kopsigîn Serokê Wezîrê Sovyêtê, Piramakov jî û herweha jî pir kesên din ji bona çarekirin pirsa Kurd li ser bingehê peymana ııavdara sala 1970 de didatin birêkirin. Herwehajî Birêjnêv bi xwe jî ve di sala ı974 de nameyeke bi taybetî ve ji bona Barzanî bi xwe ve date birêkirin, ku ew têde tevaya dildarîya xwe li ser pirsa Kurd de dide biderxistin û herwehajî ew têde pirojeyê serdarîya Iraqî ji bona çarekirina pirsa Kurd di avdara sala 1974 de pir bi kêm ve dide bidîtin, tevlivêjî de ew jê dide bixwestin, ku ew pê bête birûniştîn. Barzanî bi Merovekî pir gewre û mezin ve di mêjûwa Kurd de dihate biderkevtin. Him ew bi hozanekî pir mezin ve di warê sipahî de û bi taybetî ve bi Mamostayê şerê partîzanî ve dihate biderkevtin û

himjî ew bi hozanekî dûrbîn ve di siyasetê jî de û bi taybetî ve di siyaseta çarekirina pirsa Kurd de û di pêkananîna Dewleteke serbixwe ve di seranserî Kurdistanê de dihate biderkevtin.Wî bi vê hoz anî û dilsozîya xwe ve ji bona miletê xwe û himjî ji bona dostanîyê ligel miletên Ereb, Ecem û Turk de ji bona bi aşîtî û demokrasî ve çarekirina pirsa Kurd didate bixebatkirin, wî pêtir ji nîvsedsalî ve Rêberîya miletê xwe ji bona serxwebûna wîyî siyasî û di encamê dawî jî de ji bona pêkanîna dewleteke milî de di seranserî Kurdistanê de didate bixebatkirin û her û her miletê wî di seranserî Kurdistanê û Cîhanê de bi wê siyaseta demokrasî û merovanî ve di xebata xwe de
231
dihate biserbilindkirin Û dostên wî dihatin bipirkirin û dujminên wî him dihatin bilawazkirin û himjî dihatin bikêmkirin. Jêre di vî warê hanê de tevaya siyasetê di armancê de di sitratîcîyê de û di taktîkî de nebes tenê di rawestandîna wê de hêjîbêtir di veguhertina wê de dihate bidiyarkirin. Barzanî di vî warê hanê bi nifşekî û bêtir durbûna siyaseta Kurd di Kurdistanê de didate bidîtin û mîna Rêberekî jî wetov ligel de didate bireftarîkirin. Di tevaya rabûn û rûniştina Barzanî de çi di warê siyasî de û çi jî di warê sipahî de her û her Selah-El-Dînê Eyubî jêre bi nimûve dihate biderkevtin'". Tevaya siyaseta wîna û têgihiştina wîna di jînê de li ser felsefa Xanî de dihate bibingehkirin. Merovekî hozan û zanayî wisa di nav tirş û talîyên ceng û şer de hatîye bitirşkirin, li ber çavên wî de tevaya taktik û sitratîcîya Basîyên Faşiyên Zarokên Efleqiyi Iraqî dihate bidiyarkirin. Wî mebesta wan pir bi başî ve didate binaskirin. Herwehajî hêjîbêtir wî tevaya bingehê daxwaza Sovyêtî pir bi başî ve didate binaskirin. Jibervêjî ve wî her û her daxwaza çarekirina aşitîyî pirsa Kurd li ser bingehekî rast û durst de dûr ji xapandinê û yarîkirina siyasî de didate

bikirin. Wî yek daxwaza rewayî rast û durust û hêjîbetir bi pêwist ve ji Sovyêtê didate bikirin, belê ezê bi daxwazên we ve bêtim birûniştin, gava hûn ji mer bidin bigirawkirin, heger ku serdariya Basîyi Iraqê şerek li ser me de date bidadan, ku hûnê dê pişta me bidin bigirtin. Di vê daxwaza Barzaniyî rewayî durust de tevaya dûrbûna têgihiştina serûştîya siyaseta Basî têde dihate biderkevtin. Lêbelê Sovyêtê jê re datin bigotin, ku ev bi me ve nayête bikirin.

Ji alîyê din de paşverû û kevneperestîya Kurd jî her û her wê jî ji alîyê xwe jî de agirê şer û cengê didata bidadan. Wê li dahol û zurna cengê de li Kurdistanê de didate bilêdan û wê fermanên kevneperestîya Rojhilata Navînî bi giştî ve û nemaze fermanên Şahê Iranê bi teyabetî ve didatin bicîanîn. Vê kevneperestîya hanê bi carekê ve xwe li ser kirinên xwînmijiya Şahînşahê Iranê de bi beramberî Kurd û hêzên pêşverû ve li seranserî Rojhilata Navînî de didatin

83Ji xwe re bi dûr û dirêjî ve li ser jîyannama Selah-El-Dîn de di nivivîsta "Sela EIDîn
de" di wergerandina Erebî de ji zimanê Inglîzî de ji bal Dr. Alî Madî, EI-Ehliye
lilneşir, Bêrud ı986 de bidin bitemaşekirin.

232Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
bijibîrakirin û wan jêre didatin bişabaşkirîn û li dahol û zurnê de didatin bilêdan.

Herwehajî impiryalîya Emerîkî di rêya Wezîrê xweyî derve Kisincer de didate bixwestin, ku ew vê şûreşa hanê bi hêsanî ve ji bona berjewendîyên xwe û derxistina Sovyêtê ji tevaya Rojihilata Navîn de û pêrejî ji Iraqê de bide bigorîkirin. Wî ji xwe re li Pirsayrîya Kurd de bi nala kaxezeke yarî ve li ser mêza siyasetê de lê didate bitemaşekirin.

Di mêjûwa siyp'f, de gelek carî ev hatîye bikirin û hêjî bi pir jî ve ev dê bête bikirin. Miletekî zana û têgihiştî ne Dost dikarin wî bidin bixapandîn û nejî Dujmin dikarin bi pê ve bidin biyarîkirin. Bedbextîya miletan û herwehajî bedbextîya miletê Kurd jî di nezanîya wan de her û her hatîye biderkevtin û hêjîbêtir dê bête biderkevtin. Kurd bi nezanî ve û himjî bi neçarî ve tuşî veguhertina Dostên xwe bi Dujminên xwe ve dihatin bikirin. Hêjîbêtir û bi metirstir ve wan taktikî xwe bi sitratîcîya xwe ve datin biveguhertin. Borcuwazîya Kurdîyî nuhhatî bi lez û bez ve tevaya mêjûwa miletê xwe di xebata wîyî dirêjî tirş û talî xwînavî de didate bijibîrakirin. Wî Dost û Dujmin bi hev ve didatin biguhertin, ku ev siyaseta hanê di tevaya xebata azadîxwazîya Kurdistanê de bi bênimû ve dihate biderkevtin.
Belê di zanistîya siyasetê de Dost û Dujminên rawestyayî sarkirî nayêtin bidîtin. Dost û Dujmin di siyasetê de her û her di guhertinê de têtin biderkevtin. Bes û bi tenha ve nîşankirina Dost û Dujmin di siyasetê de li ser gihandina armancê de têtin binîşankirin. Ji bona gihandina armanca giştî, belê aramaca dewletê her pêrabûnek ji bona gihandina wê armancê hanê bi kurtirîn dem û kêmtirîn gorî ve her û her bi perst ve tête biderkevtin. Weha ev rêzana zanîstina siyasîyî hanê di nivîsta Mir de ji bal Mikavilî de hatîye bitomarkirin.
Di guhertin û veguhertina Dost û Dujminan de ligel hevdû de divê bi kêmanî ve pêşbînîya bi serkevtinê ve yanjî bi taktîkekî ve ji bona pêşbînîya bi serkevtinê ve bête biderkevtin. Jibervêjî vê ve di siyasetê de divê Merov tucarî derîyê vegerê li ber xwe de nede bidadan. Her û her divê Merov deryekî vekirinê di pêşîya xwe de bide bihiştİn. Lêbelê Borcuwazîya Kurdî nûhatî weha bi bê serpêhatî ve û hêjîbêtir bi nezanî ve xwe di nava honandin û tevnên xweyî nigaşî de dihatin

bikevtin Û ku ew xwe di nava dek û dolabên Basîyan de bidin bivezilandin.
Siyaseta Komela me, Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de di tevaya xebata xweyî siyasî de di seranserî mêjûwa xwe de ji bona gihandina rewş û zînetên di Kurdistanê de ji bona bîr û bawerîya cîhanî didate bikarkirin, herwehajî wê xwe her û her bi beşekî ve ji xebata rewayî azadîxwazî miletên cihanê û herwehajî wê xwe bi beşekî ve ji xebata azadîxwazî Kurdistanê ve didate bidîtin. Wê ji alîyekî de pir bi xurtî ve û bi dil û can ve pişta xebata miletê xwe û şûreşa wî didate bigirtin, jiber ku bes û bi tenha ve Basîyên Dagirkerên Kurdisanê bi tawankar ve di vê siyaseta hanê de dihatin biderkevtin. Ew siyaseta hanê bes û bi tenha ve ji bal Basîyên faşîyên Iraqî de li ser Kurd de hatibû bineçarîkirin û kevneperestîya Kurd xwe di nava wê de didate biderrnalekirin. Ji alîyê din de Komela me, Komela Xwendevanên Kurd li Ewrop de ji bona miletê xwe didate bi derxistin, ku Dujminê hemû milatan di seranserî cîhanê de di mêjûwa wanî dûr û di rêj de di xebata wanî azadîxwaz de her û her kevneperestî û hêzên impiryalistî dihatin biderkevtin. Hîç rojeke ji rojan tanî neha xebata miletekî ji bona azadîxwazîya wîna, serbestîya wîna û serxwebûna wîna di rêya impiryalistîyê û kevneperestîyê de nehatîye biserkevtin. Dujminên Kurdî mezin her û her di kevneperestîyê û impiryalizmê de û nemaze di kevneperestîya Şahîrışahê Iranê û impiryalizma Emerîkî de dihatin biderkevtin, yên ku ew her û her bi xwinrnij û bi xwînrijên miletê Kurd û hêzên pêşverû ve di seranserî Rojhilata Navînî de dihatin biderkevtin, hêjîbiserdejî ve kevneperestîya Şahinşahîya Iranî bi Cendermê impiryalizma Emerîkî ve di Rojhilata Navînî de ji bona talankirina dewlemendbûn wê û kolekirina miletên wê dihate biderkevtin.

Kevneperestîya Kurd bi hemû rengên xwe ve li ser bîr û bawerîyên wetov de weha pê dihatin biharkirin, ku wê weha bi dijî wan ve bi şer û ceng ve dihate bidakevtin. Wê Merovên weha bi bîr û bawerîyên wetov ve bi xurufandî ve didatin bixuyanîkirin. Xebata Kurdî rewa, ya ku ew weha ji bal seranserî hêzên pêşverû û azadîxwaz dihate bipiştlêgirtin, ew bi bê pişt ve û bi tenha xwe ve hate bimayîn û bes û bi tenha ve pişta wê bi Dujminên wê ve hatibû bigirêdan.

234Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

Basîyan di vî warê hanê de li seranserî Ewropa û Emerîka de hêzên Komnistên Iraqî û Gumgumên wan ji xwe re didatin bikaranîn û bidagirtin, ji yên ku ew bi nav ve, mîna ku Lenin di kongirê Şitugart de der sala ı9 ı2 de dide bigotin, Sosyalist bûn, lêbelê bi kar ve ew Şovînist bûn. Belê Gumgumên Gewreyên Komonistên Iraqî jî bi nav ve ew Komonist bûn, lêbelê di rastîya rastî de û di cewhera xwe de bi rast û durust ve bi faşîyên basîyên Efleqî ve dihatin biderkevtin. Basîyên faşîyên Efleqî ew ligel xwe de li bajarên Ewroipî û Emerîkî de didatin bigerandin û civîn li dû cîvanan de û pêwendî li dû pêndîyan de bi wan ve ji bona xelkê didatin bikirin. Wan tevaya xebata miletê Kurd û şûreşa wîyê dadwerî ji bona mafeyê miletê wêyî rewa û ji bona man û nema wî bi kevneperestî ve, bi Nokerên Xwefiroşên Impiryalizmê û kevneperestîyê ve bi dijî serdarîya Iraqêyê pêşverû ve, ya ku ew li ser rêya bicîanîna Sosyalistîyê de têtе biçûyîn, didatin biderxistin. Ne bes tenê van Komonistên Iraqîyî xwefiroş û hestîkojên Basîyên faşî hirîşî bi şas ve mîna Gewendan ji bona Basîyan li her der û cî ve dihatin biderkevtin, wan tucarî navê Kurdistanê bi ser zimanên xwe ve nedidatin bianîn, her û her wan navê Şemal-El-Hebîb didadtin bigotin. Partîya Komonist ligel Hevalbendên xweyî faîyî Basî de di Berê Mi1îyî Pêşverû de dihatin bibeşdarîkirin û

herwehajî ew nala Partîyekê bi careke -ve beramberî wê siyasta faşîyî Basî beramber Kurd û kurdistanê ve xweser têtin biberpirsiyarîkirin û ew nebes bi tenê ve di wî karê xwe de bi rûreşî û tawankarî ve beramber bi miletê Kurd ve dihatin biderkevtin, herwehajî hêjîbetir ew bi rûreşî û tawankarî ve biramber bi Miletê Ereb ve li Iraqê ve dihatin biderkevtin. Hêjîbêtir wan bi vê siyaseta xwe ve di encamê dawî de bi neçarî ve li ser belgeyê nemankirina xwe de li Kurdistana Iraqê de dane bimorkirin.

Dewletên mezin û giran di mêjûwê de bi siyaseteke wetov ve bi beramberî miletên jêrdest ve bi neçarî ve ji ser ruwê zemînê de hatine bimalandin.

Marx û Engels pir di warê pirsa milî de û çarekirina wêna dane binivîsandin. Bi taybetî ve wan pir bi dûr û dirêjî ve li ser çarekirina pirsa Irlendî û şêveyê çarekirina wêna dane binivîsandin. Hêjîbêtir wan her û her didatin bigotin, ku pîvana wan ji bona sosyalistîya Merovekî her û her wan ew di helwesta wîna de ji bona çarekirina

pirsa milî de didatin bidîtin; jibervêjî ve li nik wan de û li gora pîvana wan de dê pir pir ji Komonistên Iraqê û yên Erebên din de rojekê ji rojan ne bi sosyalistî û nejî bi Komonostî ve bihatana biderkevtin.

Herwehajî di vî warê hanê de pir bi dûr û dirêjî ve Lenin di nivîsta xwe de: Derbarê Çarekirina Mafê Netewan di Çarenûsa xwe de dayite binivîsandin. Wî Roza Luxumburga Sosyalistîya Elmanî bi Puşt ve didate binavkirin; jiber ku ew bi mafeyê çarenûsa Polonî ve nedihate birûniştin. Li nik Lenin de Mafeyê çarenûs bi nala mafeyekî serûştîyê Netewan ve tête biderkevtin û ew her kat û zemanekî û di bin her merc û zînetekê de divê pê bête birûniştin. Mafeyê çarenûs di pêkanîna dewleteke milî de bi serwerîya miletan ve tête biderkevtin,

ew mafeyê hanê ne tête bidan û nejî ew dîkare ji miletan bête bisitendin. Ew mafeyê hanê ne ji bona Xanedanên miletekî, nejî ji bona Burcuwazîya wîna û herwehajî nejî ji bona Karkerên wî miletî pê tête birûniştin, lêbelê ew bes û bi tehna ve her û her bi mafêyê milet ve tête biderkevtin û li ser hemû Sosyalîstan, Komonistan û hêjîbêtir ew li ser Demokratan jî tête bidivakirin, ku ew bi wî mafeyê hanê ve bi bê merc û bend ve pê bêtin birûniştin; jiber ku Mafeyê Netewan di Çarenûsa wan de bi mafeyê serûştîyî miletan ve tête biderkevtin.
Weha Lenin li ser Mafeyê Çarenûs de û pêkanîna dewleteke milîyî serbixwe ve dide biaxivtin. Hêjîbêtir di tevaya Mêjûwa Ewropa de di piştî hatina Borcuwazîyê de ji bona serdariya welêt şer û cengên mezin di nava welatên Ewropî de Ji ser azadî, serxwebûn û pêkanîna dewletên milî de hate bivêkevtin. Bi Melyonan Merov di vî warê hanê de û di wan şer û cengên harî tenûrî de hatin bikuştin bisûtandin."
Imperatoriyên gewre û mezin li ser neçarekirina wê pirsa milî de di mafê çarenûsê de him hatinê bipaşketin û him jî ji ser rûwê zemînê de
84Ji xwe re li ser van cengên giran û mezin di Ewropa de di nivista Kant de .Zum
ewigen Frieden" -Ji bona Aşîtiya hergavi- bidin biternaşkirin, ya ku ew ji ı796-
ı7800 hatîye binivîsandin, Verlag Philipp Reclam jun. Leipzig 1984 de bidin
biternaşkirin.
Ev nivista hanê ji bal Seid Nakam bi zimanê Kurdî ve bi zaravayê soranî ve li jêr
Navnîşana " Kurd li Mêjûwa Dirawesekanida", "Siyahetnamey Giya Çelebî" de

hatîye biwergerandin û ewdi çapxana korî Zanyarî Kurd de, Begdad ı979 de hatîye
biçapkirin.
236Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
hatine bimalandin. Ji bona nimû Lischtenstein -Litinitayin- bi biçûktirîn dewleta mîlî ve li Ewropa de tête biderkevtin, ku serjimara amara xelkên wê bi 25000 Kes ve tête biderkevtin.
Di pişti bi dawîhatina cenga cîhanîyî duwem ve di 26. 6.1946 de Sazmendîya Yekîtîya Netewan li San Francisco de di Yekgirtina Dewletên Emerîkî de hate bidurustkirin. Yekek ji girîngtirîn bendên bingehîyî vê sazmendîya hanêyê Navnetewî benda pêrûnişting bi Mafeyê Çarenusê Netewan ve tête biderkevtin, ya ku têde tête bigotin, da ku nifşên tên ji cengê bêtin biparastin. Jibervêjî ve divê li vê derê de bête bidubarekirin, ku pêrûnişta bi mafeyê çarenûsa Netewan ve ji bona pêkanina dewleteke milîyî ser bi xwe ve ne ji alîyekî demokrasî ve, nejî ji alîyekî pêşverû ve û nejî ji alîyekî merovanî ve tête biderkevtin, na. Ew bes û bi tenha bi neçarîyeke mêjûyî ve tête biderkevtin, ew bi mîna qanûneke serûştî ve tête biderkevtin. Her Merovekî ji miletekî zal kirî li ser miletekî din de bi vî mafeyê hanê ve .bes û bi tenha ve di têgihiştina wîyî dûr de ji bona qazanc û berjewendîya miletê wî ve tête biderkevtin, yanjî bi neçarî ve tête biderkevtin, jiber ku welatê miletê jêrdest bi goristana miletê zalkirî ve di encamê dawî de bi rep û rast ve tête biderkevtin û tevaya hatin û dewlemendbûna miletê zaldar bi bê sûd ve ji bona nava tenûra şer û cengê ve bi dijî miletê jêrdest ve tête biavêtin.
Wetov heger ku Rom, Ereb û Ecem bi vî mafeyê miletê kurd ve di mafeyê çarenûsa wî de ji bona pêkanîna dewleteke milîyî serbixwe ve pê neyêt in birûnişting, di encamê dawî de her û her dê ew

bi zîyana wan ve bête biderkevtin û Kurdistan dê bi goristana wan ve mîna Viyetnamê bête biderkevtin.
Di cara pêşî de di mêjûwa Merovanîyê de Hegel di Felsefa Mêjûwê de der sala 1828 de di peyvdarîyên xwe de di zanistgeha Berlin dide bigotin: "Civateke Azad Civateke din nade bijêrdestkirin." Di pişt re Marx di nava lênerîna tevaya jîna Mirovan de û di hemû qonaxên mêjûwê de û li ser bingehê wê remana bilindî Hegel de dide bigotin: "Miletekî Azad miletekî din nade bijêrdestkirin". Magelo tanî kengî dê Rom, Ereb û Ecem li ber vê rastîya tirşîya mêjûwê û serpêhatîya Merovan de nêyetin biliberkevtin. Rom, Ereb û Ecem xwe ji bona nava sedsalê bîstûyekem bi kole û bendekirina Kurd û Kurdistanê ve didin biavêtin, yê ku ew têde hêjîbêtir ji miletê Kurd di

Kurdistanê dê pir bêtin biêşandin. Pirsa Kurd û çarekirina wêna di bin serdarîya wan de bi agirê bin kayê ve tête biderkevtin. Hêjîbêtir ew bi nexweşîya Kevjal ve bi bê derman ve di nava mejîyên wanî rehperestî genî de di vê serdema me de tête biderkevtin. Çarekirina pirsa Kurd bi ezmûneke pir giran ve ji bona têgihiştina Welatperwerên Turk, Ereb û Farisan di pêşkevtin û geşbûna welat û miletên xwe de tête biderkevtin. Çend ji wan re dê bi bedbextî ve bête biderkevtin, gava ku ev pirsa hanê di rêya şer û cengan de di rêya xebata miletê Kurd de û bi piştgirtin wêna ve ji bal vê dewletê yanjî yan din de ji bona berjewendî û qazanca xwe bide biçarekirin.
Bes û bi tenha ve ji bona nimû ne û bi bê şer ve bes û bi tenha ve di nava rêya Demokrasîyê de xwestina çarekirina pirsa Kurd ji Turkî re, ji Iran re, ji Iraqê re û ji Surî re bi gewretirîn kosp li ber wan de tête biderkevtin; jiber ku ew welatên dagîrkerên Kurdistanê nikarin rojekê ji rojan bi welatekî demokrasî ve bêtin biderkevtin, tanî ku ew

bi mafeyê çarenûsa miletê Kurd ve di pêkanîna dewleta wîyî milî de neyêtin bipêrûniştin. Hêjîbetir di tevaya serpêhatîya miletan de di vê serdema me de hîç miletek nikare gaveke baş baş û bi kare ve ber bi pêşvecûnê ve bide biavêtin û ew bi pêşkevtina miletên din ve bête bigihandin û bi bextiyarî û geşî ve bête bijîyandin, heger ku ew di nava civakeke demokrasî de neyête bijîyandin. Em bes û bi tenha ve vê rastîya tirş û talî mêjûyî ji bona Dagîrkerên Rom, Ereb û Ecem didin bigotin, da ku ew me û xwe tûşî destanekê nedin bikirin, ya ku ew di encamê de wî de bi ser serên wan ve bi neçarî ve û li ser bingehên hêzên qanûnên jînê de dê bête biderkevtin. Talankirina dewlemendbûna welatê miletekî û Kole û bendekîrina wî di vê serdema me de nema dikare bête bikirin. Tevaya serpêhatîya miletan di pêla azadîyaxwazîya wan de di vê sedema me de ji me re vê rastîya hanê dide biderxistin.

Partîya Demokratî Kurdistan vê nameya hanê ji bona Partîya
Basî di 12. 1. ı972 de wetov dide binivîsandin:

"Partîya Demokratî Kurdistan -Deftera Siyasî-
Ji bona Rêberîya Deverîyî Partîya Basiyî Erebîyî Sosyalistîyî hêja de Pişti silavan.

238Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

Li ser daxwaza Rêberîya Partîya weyî dost de, ya ku ew di pêşgotina pirojeyî Peymana Karê Welatî de hatîye bihatin û ya ku wê ji bona hemû hêz û perçên welatî û pêşkevtî de ji bona peyvînê li ser pirojeyê Peymanê de û herwehajî pêrejî derxistina amadebûna xweyî dilsoz ji bona vekirina rûpelekî nuhî bi ronahî ve di mêjûwa xebata dilbijandî de ji bona armancên meyî welatî û milî de dayite bibangkirin, partîya me bi divabûn ve li ser xwe de dide bidîtin, ku dîtina xwe li ser pirojeyê Peymanê de bide biderxistin. Me bi başî ve

date bidîtin, ku em piçekî bêhnfirehbûnê bidin biderxistin, berî ku em vê dîtina xwe di rêya rojnemevanîyê de di nava zînetên wehayî hûr de bidin biderxistin, me wetov bi baştir ve date bidîtin, ku em wê ji bona we di rêya vê bibîrxistina hanê de bidin bipêşkeşkirin.
Hoyê vê jî, mîna ku li ser we de nayête biveşartin, ji bona ser pêwendîyên di nava herdu partîyên me de tête biderkevtin, ji yên ku ew di nava van rojên hanê de mexabin bi tujtirîn pileyê nobûnê û berjêrbûnê ve têtin bikevtin. Dujmin, Çavdêr û hemû, ji yên ku ew bes û bi tenha ve ji bona nehiştina pêwendîya hevalbendîtîyê û dostanîyê di nava partîyên me de guh pê didin bidan, li her destpêkirinekê de bi ne başîyî nuh ve didin biçavdêrîkirin, ya ku ew di vî war û berê hanê de ji partîya me tête biderkevtin.
Birayên Hêja
Di be, ku bi başî ve bête bigotin, ku em bidin binîşankirin, ku partîya me durujmê Berê Welatîyî Yekgirtî ji roja damezrandina xwe de bêtir ji çaryeke sedsalî de dayite bibilindkirin û wê hemû karînên xwe her û her û bi dilsozî ve li pênavê pêkanîna wî Berê hanê û derxistina wêna de ji bona ser ruwê hebûnê dane bikaranîn; jiber ku ew li ber zînetên Iraqêyî navxweyî û derveyî de bi başî ve dihate biliberkevtin. Herwehajî wê didate bibawerîkirin, ku bes û bi tenha ve bi rêya girawkirî ve ji bona ayinda miletê meyî Iraqî ve û rizgarîkirina wîyî abûrî, civakî û siyasî ve têtе biderkevtin, yê ku ew hemû niyazmendîyên pêwistî ji bona pêrabûna miletê meyî Kurd bi mafeyên xweyî rewa ve di nava çarçopê welatê meyî yekgirtî de dide biamadekirin. Jibervêjî ve partîya me her û her û bi jêhatîbûnên xwe ve di hemû rabûnan û serhildanan de didate bibeşdarîkirin, ji yên ku ew ji bal cemawerên miletê meyî Iarqî û partîyên wîyi welatî de bi dijî Impiryalîyê û Kevneperestîyê ve dihatin bivêkevtin. Herwehajî partîya

me di nava Encumena Hevakarîya Welatî de hate bibeşdarîkirin. Herwehajî wê ew erkên hanê bi ser milên xwe ve datin bihildan, ji yên ku Berê Yekîtîya Welatî di sala 1957 de ji bona ser milên xwe dabûn bihilgirtin, tevî ku pir kosp jî di rêya kevtina wê de ji bona nava wî Berê bi navkirî ve di wê dema hanê de hatibûn bidanîn. Partî li ser wê bememaya hanê de bi xwe ve piştî bi serkevtina şûreşa çardehê tîrmehê jî hate biçûyîn û ji gewretirîn karên wê di vî barê hanê de hevkarîya wêyî beşdarî ligel partîya weyî têkoşer de di biserkevtina gewre de tête biderkevtin, ya ku ew ji bal miletê meyî Iraqî de bi Ereb û Kurd ve di yanzdehê av dara mêjûyî de hate bidestkevtin, ya ku wê hîmekî bingehî ji bona Berê Welatîyî Pêşkevtî date bidanîn û herweha jî wê rê date biamadekirin, da ku pirojeyê Peymanê bête bidazanîn.

Di nava pir hatinan de û bêtir bigir ji salekê de di nava dîtinên ligel hevdûyî de pêl bi pêl ve, ji yên ku ew di navbera herdu partîyên me de dihatin bigirêdan, hatibû bibiryardan, ku divê bi navroka Peymanê ve neyêtê bibiryardan û herwehajî ew ji bona Lawên milet neyête bidazanîn, tanî ku herdu alî li ser de nedin biaxivtin û li ser de ligel hevdû de nedin bişêwirdarîkirin; belam tiştê ku bi rastî ve hate bikirin, ku Hevalên me bi daneyekî jê ve bi berî du rojan ve ji derketina wê ve hatin bidestkevtin, berî ku li ser dîtina me de di vî warê hanê de bête biguhdarîkirin. Tevijî ku em didin bidîtin, ku dê bi baştir ve bihata biderkevtin, ku di pêşî de lihevhatinek di navbera hemû hêzên welatî, milî û pêşkevtî de li ser reşbeleka wê de bihata biderkevtin û divabû wetov bi tevaya bîr û bawerîya wan hêzan ve bi carekê ve cemawer li ser navroka reşbelaka wê peymana hanê de bihatana birûkirin; tevlivêjî de bi derkevtina peymanê ve û bi

bangkirina yên din ve ji bona gift û gokirinê li ser de bi mebesta beşdarîbûnê ve ji bona danîna nivîsandîrıa navroka wêyî dawî de em bi karekî hêjakirî û nerxikirî ve didin bidîtin.
Bi serûştî ve ji bona gihandina bi cîanîna vê aram anca hanê ve tête biderkevtin, ku divê zîneteke baş bête biafirandin û azadîyên demokrasî ji bona hêz, partîyên welatî û pêşverû bêtin biberdan, ku divê rêz li mafeyên Nefer de bêtin bigirtin, da ku kês li ber tevan de ji bona derkirina dîtinên xwe bidin biderxistin û gift û gokirin li ser bendên û berên pirojeyê Peyrnanêyî pêşnehadkirî de bêtin bikirin, da
240Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
With best wishes for a constnıctive and successful seminar."

Ev raportê hanê bi şêweyekî akadimîyî zanistîyi pir bilind ve û li ser amaran û rûrdanên rast û dunıst ji bona Beşdarên seminar hatîye bipeşkeşkirin. Ev pir bi belgeyekî mêjûyîyî giring ve ne bes tenê ji bona neha herwehajî ji bona ayinde jî tête biderkevtin. Ew bi kurtî û givaştî ve di şeş babetan de ronahî ji bona ser siyaseta serdarîyên Iraqê ji sala 1961 tanî sala 1974 de dide biavêtin.

Ew di babetê yekem de li ser Neşînvanîya Dewletê de dide

biaxivtin û tevaya siyaseta serdarîya Iraqê berambar bi Kurdan ve û cudakirina wêna di navbera Neşînvanên Ereb û Kurd de û herweha jî bê çawan wêna bi hezaran ve ji Kurdan ji iraqê dane biderkirin. Neşînvanên Dewletê ji Kurdan bigir bi bê mafeyên xweyî neşinvanîyê têtin biderkevtin û bi çavên destê duwem li wan de têtin bitemaşekirin. Di babetê duwem de ew li ser Perwerdekirinê de dide biaxivtin û çawan di vî warê hanê de ew bi amar û belge ve tevaya siyaseta serdarîyên Iraqê di Kurdistanê de û herwehajî beramberî bi Kurd ve dide biderxistin, ya ku ew her u her Kurdan di nava welatê wan de ji perwerdekirinê û fêrkirinê di hemû waran de dide bibêpişkûparkirin. Herwehajî ew di vî warê hanê de tevaya siyaseta rehperestîyî erebî beramber bi Kurd û Kurdistanê ve dide biderxistin.

Di babetê sêyem de li ser Serdarîyê de dide biaxivtin, ku têde li ser wizareta liberxwedanê de, li ser wizareta derve de, li ser wizareta neftê de û li ser Civata Encumena Wezîran de dide biaxivtin, ku di nava van wizaretan de Kurd bigir bi bê pişk û par ve têtin biderkevtin. Bi tu awayekî ve Kurd di nava wan wizaretan de ne li gora endazîya serjimara xwe û ne ji li gora berjewendiya xwe tête biwênerîkirin. Kurd di nava wan wizaretan de bes û bi tenha ve ji bal Nokerên serdarîya Ereb de bi navê Kurd ve têtin biwênerîkirin.

Di babetê çarem de ew li ser Abûri de dide bi axivtin. Ew dewlemendbûna Kurdistanê dide biderxistin, ku 70% nefta Iraqê ji Kurdistanê tête biderkevtin; belam Kurd bigir bi careke ve jê bi bê pişk û par ve têtin biderkevtin. Bes û bi tenha ve 7-12 % ji hatina

96Kurdistan, Annual Journal of KSSE- Kovara Organa Komela Xwendevanên kurd
li Ewropa de-, Vol. XVII 1974.

286Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

Dewletê ji bona xercikirina wê di Kurdistanê de tête bikirin û ew ji bona avekirina rêyên sipahî, serbazxan didin bixerckirin. Herwehajî ew raport dide bixuyanîkirin, ku li Iraqê de 140 karxanê hatine biavakirin ku bes û bi tenha ve 4 ji wan li Kurdistanê de têtin bidîtin. Herwehajî têde li ser Endamên dam û destgehên pilankirinê dide biaxivtin, ku ji 25 Endamên wê bes û bi tenha ve yek Kurd tête biderkevtin. Herwehajî li ser avedanîyê de ji bona avdanê erdên dêm dide biaxivtin, ku li hereme Kerkukê de pirojek bi 200 milyon dolar hatîye bi avakirin, le ew zevîyên Kurdan nade biavdan, lêbele ew zevîyên Ereban dide biavdan.

Di babetê pêncem de ew li ser siyaseta Teroristîyê de dide biaxivtin, ku çawan serdarî siyaseteke dir û hov beramber bi Endamên partî û Xelkên Kurdistanê ve dide bikaranîn.

Herwehajîew têde hemû pêrabûnê serdarîyê bi kuştina Barzanî, Idris, Ebdul-Wehab Etrûşî û girtina pir ji kesên din û kuştina wan bi mêjû ve û bi nav û nîşan ve dide biderxistin.

Di babetê şeşem de ew li ser qirkirinê de dide biaxivtin. Ew bi belge û amar ve ji sala 1963 tanî sala 1974 de û bi nav û nîşan ve tevaya wê siyaseta qirkirina Kurd dide bi derxistin û herwehajî ew navê wan cihan di gund û bajaran de dide biderxistin, cihê ku serdarîyê siyaseta bi qirkirinê ve têde didate bikaranîn.

Bi kurtî ve ev raportê hanê pir li ser xwe de û bi amarên hûr û kur ve û birastîyên diyar ve ji bona Endamên Seminar hate bipêşkeşkirin. Ev dê bi belgeyekî mêjûyî ve ji bona Nifşên tên bête bihiştin, be kanî serdariyên Iraqîyî hover çi bi serê milet û welatê me ve dayite bianîn. Herwehajî têde tête bixuyanîkirin, bê kanî çawan Welatperwerên Kurd dane bixwestin, ku ew pirsa welat û miletê xwe bi bîr û bawerîya cîhanê re bidin bigihadin, da ku ew pişta xebata gelê

Kurdî rewa ji bona rizgarîkirina wîna ji zor û sitema serdarîya faşiyî Erebî li Iraqe de bidin bigirtin.
Di piştî vê şikendina hanê de di gorepana şer de mekîna wêyî sipahî him ji alîyê hêza Merovanî de û himjî ji alîyê hêza wêyî teqemenîyê de pir hate bilawazîkirin û şikenandin û kevtina wê bi eşkere ve roj bi roj ve dihate biderkevtin. Weha bes û bi tenha ve du rê li ber Basîyan de ji bona bi dawîanîna şer ve dihatin biderkevtin.
287
Di rêya yekem de dihate biderkevtin ku ew careke din di rêya Sovyêtê de ligel Barzanî de bidin û bistînin, daku ew li ser bingehê peymana 11 avdara sala 1970 de bi rast û durustî ve ûji bon abicîanîna wêna ligel Barzanî de bêtin bilihevhatin, dê ew di vir de bi neçarî ve bi lawazî ve him bi baramberî Sovyêtê ve û himjî bi beramberî Barazni ve bihatana biderkevtin. Jibervêjî ve Sovyête çek ji bona wan nedidatin bifirotİn. Ji şov înî û kîndariya Basiyan de berambe bi miletê Kurd ve wan nikaribûn ji xwe re bidana ser vê rêya rast û durust û himjîbêtir di nava wê de tevaya bextîyarîya miletê Iraqê bi Ereb û Kurd ve dihate bidîtin.
Di rêya duwem de divabû Basî ji bona Şahê Iranê bêtin bidakevtin û daxwazên Şah bidin bicîanin û bi zalbûna wina ve li ser kendava Farisî de bête bipêrûniştin.
Basiyên Iraqî ji xwe re rêya duwem datin bigirtin. Belê wan bi xwe jî ve di tevaya siyaseta xwe de ji xwe re didatin bixwestin, ku ew bi kevirekî ve du çûkan ji xwe re bidin bikûştin, Wan dixwestin, ku ew xwe him ji şûreşa Kurd û hirnjî ji zalbûna kêra Sovyêt li ser Iraqê de bidin birizgarîkirin. Lêbelê li gora pilana wan de wetov nedihate biderkevtin, ku ew xwe ji şureşa Kurd û kêra zalbûna Sovyêtê wetov bêtin birizgarîkirin, ku ew wetov bi qûl û kûrî ve ji bona Şah bêtin

bidakevtin û serên xwe di encamê dawî de ji bona nava cuhera Şah ve bidin bixistin. Ev pirojeyê Basî jî hate bitêkûpêkçûn, jiber qehremaniya Pêşmergeyên Kurdistan di liberxwedana bê nimûne de di rnêjûwa şerê Kurdistanê de dihate biderkevtin. Wan hêviyeke û pêşbîniyeke wetov ji xwe re nedabûn bikirin, ku di encamê dawî de bes û bi tenha ve ji bona wan herdu rêyan bêtin bineçarîkirin. Herwehajî ne Kurdan û nejî Sovyêtê jî weha bi serên wan ve dihate bikevtin, ku dê Basîyên Iraqê ji bona ser rêyeke wetov ji bona wan di encamê dawî de pir him bi ziyan ve û himjî bi tirs ve ji xwe re bidin bigirtin.

Merov li vir de dikare bide bigotin, ku pêşbîniyên herdu layan jî bi rast ve nehatin biderkevtin û berê çûnan him bi ziyana Kurdan û Sosyête ve û him jî bi zîyana Basiyên Iraqê ve bi xwe ve dihate biderkevtin. Di berê van çûnan de jê ji bona him Şah û himjî Impiryalîya Emerîkî jê bi kar ve hatin biderkevtin.

288Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

Peymana 6 avdara sala 197597

Di 6 avadara sala 1975 di kombûneke Sazmendîya Opikî neftê de li bajarê Cezair de

li ser destên Serokê Komara Dewleta Cezairî Abu-Medyen de peymana Cezair di navbera Sedam Husên Serokê Komara Iraqê de û Şahînşahê Iranê Mohamed Riza Pehlevî de hate bigirêdan. Di vê peymana hanê de wan dixwestin, ku ew pirsên bi cudabûn ve di nava herdu dewletên xwe de bi aşîtî ve û li ser mêza gift û gokirinê de bidin biçarekirin.

Di mêjûwa Diplomasî de çarekirina pirsên wetov di navbera dewletan de bi vî rengê hanê ne ve bes ew bi divabûn ve têtin biderkevtin, lêbelê jî bi rewa ve têtin biderkevtin.

Miletê Kurd jî her û her di tevaya xebata xweyî siyasî de ji bona çarekirina cudabûnan û pevçûnan di navbera dewletan de didate bixebatkirin, ku ew pirsên hanê bi diplomasî ve û bi şêveyekî aşîtî ve li ser qazanc û berjewendîya miletan de bête biçarekirin; jiber gava ku ew çarekirina wan pirsên hanê ne li ser qazanc û berjewendîya Miletan de bête biçarekirin, di encamê dawî de ew peymana hanê bi serê xwedîyên xwe ve tête biteqandin, lêbelê vê carê deha ji cudabûn û

97Ji xwe re bi dûr û dirêjî di vî babetê hanê de li nivista pir hêjayî Circis Fethulah de

bi zimanê Erebî ve: Serdanekji bona mêja nêzîk de, r. 112 - 116 bidin bitemaekirin.

Bi rastî ve kêm Merovan wetov bi bingehî ve û hejîbêtir bi zanistî ve li ser Peymna

I ıAvdarê de tanî rıeha dayête binivîsandin.

Pir bi sûd ve tête biderkevtin, ku Keç û Xortên Kurd pir bi hûr û kûr ve ji xwe re vê nivista pir nerx ve bidin bixwendekarîkirin, da ku ew hinekî bêtir li ber

ûrea Ilula mezin de û hêjîbêtir li ber ûrea Gulanê de bêtin bikevtin. Li berkevtina

van herdu ûrean de me bêtir di neha me de û hêjîbêtir di sibeha me de dide

biliberxistin.

Pir bi seyr ve tête biderkevtin, ku rûdanên neha di nava partîya Demokratî Kurdistan

de mîna rûdanen pêla Peymana 11 Avdara sala 1970 de têtin biderkevtin. Merov

batir dikare li ber rûdanên neha bête biliberkevtin, gava Merov rûdanên wê pêlê ji

xwe re dide binaskirin.
289
pevçûnên berê bi xurtir ve û pir bi zîyan tir ve têtin biderkevtin. Ev peymana hanê jî bi derbasbûna zeman ve rast û durust wetov hate biderkevtin.
Di vê peymana li hevtina di navbera Şah û Sedam de Iraqê bi parvekirina çemê Şet-El-Ereb ve di navbera xwe û Iranê de pêhate birûniştin û herwehajî hin ji navçeyên Iraqîyî li ser sînor de ji bona Iranê hatin bidan. Belê sînorê di navbera Iraqê de û Iranê ji nû ve li ser bingehê peymana 6 avdara Cezair de hate bidanîn. Ev sînorê hanê di navbera Selteneta Osmanî de û Şahînşahîya Iranî li ser destên Wênerên Encumena danîna sînor de ji bal dewleta Igilistanê; Firensa û Rusan de bi piştî xwendekarîyeke û neqş kirineke sê salî de li ser cih û di nava cih de di sala 1913 de di Pirotokola Qenstentîyê de him ji bal Selteneta Osmanî û himjî ji bal Şahînşayî Iranê de û ligel wênerê hersên Dewlelên Mezin de li ser de hate bimorkirin. Bes û bi tenha ve ji bona bi bîrxistinê ve Wênerê Rusî Minoriskî, yê ku ew bi yekekî ve ji gewretirîn Kurdnas ve dihate biderkevtin, dihate bidîtin. Piştî pêkhatîna dewleta Iraqê di sala 1922 de ev sînorê hanê jî careke din bi saya serê Ingilistanê ve hate bimayîn.
Dewleta Iranê di piştî morkirina li ser Pirotokola Qestenîye de di sala 1913 de her û her xwe bi zîyan ve didate bidîtin; jiber ku di vê pirotokala sînor de tevaya Şet El-Ereb bi sînorê Iraqê ve dihate biderkevtin û bes û bi tenh ve kenarê çem bi sînorê Iranê ve dihate biderkevtin. Iran di keştîkirinê de di vî çemê pir giringî hanê de ji bona ser kendava Farisî him di warê bazirganîyê de û him jî di warê sipahî de dihate bibêpişk û bibêparkirin. Jiber vê wê dixwest hergav vî sînorê hanê di vî çemî de bide biguhertin û wî sînorî li ser parvekirina çeman

de di nava dewletan de li ser bingehê gotina Elmanî de Talweg -Rêya Newalê bide bidanîn. Rêya Newalî di parvekirina çeman de di nava dewletan de bigir li tevaya Ewropa de têtе biderkevtin. Ew bi nîvê binê çem ve têtе biderkevtin û hergav Merov dikare wî bide bipîvandin".

98Ji xwe re li vê derê de bêtir li ser danîna sînor de di navbera Selteneta Osmanî û

Şahînşahîya Iranê li nivîsta Dr. Celîlê Celîl de bi zimanê Rusî ve û wergerandin ji

bona zimanê Kurdî ji bal Dr. Kawês Qeftan de di bin nav û nîşana .Kordekani

Imperetorîya Osmanî de" , r. 252 - 259, Bagdad sala 1987 de bidin bitemaşkirin.

290Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

Şahê Iranê gava ku ew di salên heftîyî de pir hate bixurtkirin û wî hêjîbêtir bi xurtî ve didate bixwestin, ku ew li ser çûna rêya Pirosîyî Elmanî ji hemû layekî de mezinbûna dewleta Axmenîyî Iranî Korşê Mezin di 631 berê zayînê de bide bivegerandin. Jibervêjii ve wî destpê salên heftîyê de li bajarê Pirsî Polis gewretirîn Mêvandarî û ahengî di Mêjûwa dewletan de ji bona derbasbûna 2500 sal li ser durustkirina dewleta Iranê de date bilidarxistin. Belê pir dewletên mezin, giran û bi kêr ve di mêjûwa Merovanê hatin biditîn û hin ji van dewletên hanê pir dane bidirêjkirin, lêbelê ew nema têtin bidîtin. Bes û bi tenha ve ji bona nimûne dewleta Misrîyî kevnar çar hezar sal li dû hevdû de hate bidirêjkirin, dewleta Babilistanê du hezar sal li dû hevdû de date bidirêjkirin û ew bi nafka bajartî û şahristanîya Merovan ve dihate biderkevtin. Dewleta Aşurî hezar salî li dû hevdû de date bidirêjkirin û herwehajî dewleta Roma hezar salî li dûhevdû de date bidirêjkirin. Ev

dewletên mezinî giran ji ser ruwê zeminî hatin bihilanîn. Bes û bi tenha ve du dewletê weha kevnar ji mêjûwa Merovanîyê de hatine bihiştin. Yek j i wan bi Iran ve û yandin bi Hebeşe ve tête biderkevtin. Dewletên mezinî beşdar ji bona danîna sînorê Şet-EI-Ereb bi wî rengê hanê ve pir bi dûrbûn ve ji xwe re li pirsa danîna sînor de û bi taybetî ve Ingilistanê lê didate bitemaşekirin.

Sal bi sala 1913 ve dihate biderkevtin. Elmanan ji nîva sala 1912 de dest bi amadekirina xwe ve ji bona Cenga Cîhanîyî Yekem didatin bikirin. Şiva hesîniyî tirênê ji Berlin tanî Besra hatibû bidanîn ew ji bona Bagdadê hatibû bigihandin. Di vê salê jî de Padîşahê Elmanî ji bona şamê di ahenga vekirina şiva hesinî tirênê de ji bona Medinê li Hicazê de hate biamadekirin û wî di gotina xwe de bi dil û can ve pişgirtîna Elman bi xurtî ve ji bona parastîna xakê Selteneta Osmanî date biderxistin. Her kesekî ji xwe re didate bizanîn, ku Elmanan ev herdu şivên hesînî tirinê him ji bona berjewendîya bazirganîya xwe û himjî ji bona livandina sipahî di seranserî Rojhilata Navînî de di dema her cengekê de dabûn biavkirin. Ingilistanê ji xwe re Iraq bi dûr ve yanjî bi nêzîk ve bi vegirtina wêna ve him ji bona girawkirina rêya Hindistanê û himjî ji bona girawkirina neftê di ayinde de dabû bidanîn. Wê bi tu corekî ve nedidate bixwestin, ku ew bi destên Iranîyan ve ji bona gihandina wanî bazirganî û sipahê di rêya Şet-EIEreb de bi kendava Farisî ve bête bigihandin. Jibervêjî ve sînor çemê

291

Şet-EI-Ereb wetov hate bidanîn. Him Ingilistanê û himjî Firensa di danîn sîronên çeman de didatin bizanîn, ku ew her û her li Ewropa de li ser bingehê Talweg de dihatin bidanîn.

Şahê Iranê bi her awayekî ve û bi piş girtina Emerîkî ve didate bixwestin, ku ew bi zaldarê ser kendava Farisî ve bête bikevtin;

jibervêjî ve divabû, ku ew berî hertiştî ji bona gihandina vê mebesta hanê sînorê xweyî Serûşti bi hezaran sal ve bide bivegerandin. Herwehajî divabû ku ew xurtbûna zalbûna dewleta Iraqêyî piştgirî bi xurtî ve ji bal Sovyêtê de li ser dewletên Erebî de di kendava Farisîyî de bi carekê ve bide bilawazîkirin; jiber ku Herwehajî Dewleta Emerîkî ji bona derxistina zalbûna kêra Sovyêtê ji Iraqê bi xurtî ve pişta Hevalbendê xweyî şêrîn Şahê Iranê didate bigirtin.
Gelek nakokî di nava Iraqê û Iranê de di destpêkirina salên heftêyî de li ser zalbûna kendava Farîsî de datin bidestpêkirin, gava ku serbazê dawîyî Ingilizê ji kendava Farîsî de di sala 1971 de hate biderkevtin û valabûneke siyasî di wê herema dewlemend û kêrdar de hate bidîtin. Iran û Iraqê herduwan bi hev re berberîyeke mezin li ser zalbûna Mîrneşînîyên kendava Farîsî de didatin bikişandin; jiber ku Iran ev kendava hanê di seranserî mêjûwa Rojhilat de li jêr zalbûna xwe de didate bidîtin û hêjîbêtir jiber ku piranîya pir ji Xelkên van Mîrneşînîyên kendava Farisî de him bi Şiî ve û him jî bi Farîsî ve têtin biderkevtin, ku evaya di encamê dawî de vê kendava hanê dûr yanjî nêzîk li jêr kêra Iranê de dide bixistin. Iranê bi dagirtina wê valabûna siyasî ve li paş derkevtina Ingilîz de ji heremê de date bidestpêkirin. Wê Giravên Iraniyî li ser rêya Tengavîya Hurmoz de datin bigirtin, yên ku ew ji bal Ingilistanê de ji bona parastina keştîkirina deryayî di tengavîya Hurmuz de ji xwe re dabûn bivegirtin. Wetov Iranê zalbûna xwe li ser tengavîya Hurmoz de date bicîanîn û herwehajî wê bi xurtî ve didate bixwestin, ku ew keştîkirina di rêya Şet El-Ereb de bi darê zorê ve ji bona bi karanîna wî çemî ji xwe re him di warê bazirganîyê de û himjî di warê sipahî de bide bikaranîn, ku ev karê Iranî di

292Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

keştîkirina vî çemê hanê de bi dijî peymana Sînor ve li ser bingehê

peymana Qestentîyê de der sala 1913 de dihate biderkevtin."
Di vê pêla hestyarî hanê de serdarîya Iraqê bi xurtî ve û bi bemamekirî ve dest bi Erebkirina Kurdistanê ve ji Kerkûkê, Xaneqîn, Sincarê û cihên din de Kurd ji cihên Bav û kalên wan ji pêla Somerî de ji berî pênc hezar salî de didatin bidestpêkirin û li şûwan de Ereb didatin bicî û biwarkirin. Herwehajî berzbûna dijbûna Iraqê ligel Iranê de di wê rojê de dihate biderkevtin, gava ku Iraqê ji ber armancên xweyî veşartî de di nemankirina şûreşa Kurdistanê de di sala ı972 de peymana Hevkarîyî ne pêbawerkirî di navbera xwe û Sovyête de date bigirêdan. Bele vê peymana hanê kêreke pir giran û mezin di rûdanên siyasîyî hatî de di Rojhilata Navî de date bikirin."?'
Him Pêrabûnên Basîyan di kurdistanê de di piştî morkirina Peymana ı1 avdara sala ı970 de û bi taybetî ve bi derkirina pêşîyî bi dehan hezar Kurdên Feylî ve ji Bagdadê de di sala 1972 û barkirina wanji bona Iranê!", himjî bi hewildana kuştina Idrîs ve li Begdadê de, himjî bi hewildana Kuştina Barzanî ve û hêjîbêtir bi destpêkirina bi xurtî ve ji bona erebkirina Kurdistanê ve û bi morkirina vê peymana hevkarîyî Sovyêtî ve, nejiber ku Barzanî bi dijî vê Peymanhê hanê ve dihate biderkevtin, lêbelê bes û bi tenha ve dewleta Iraqê di ve peymana hanê de bi tenha kirina Barzanî ve him ji piştigitina Sovyêtê, ya ku ew bi textikê pita ûreê ve dihate biderkevtin û himjî ji piştgirtina hêzên Pêşverû didate bimebestinkirin.
99Berî vê peymana hanê di navbera Selteneta Osmanî û dewleta Sefewî de li ser
sînor de di navbera wan de peyma sala 1555 de û di piştre peymana Qesra Şêrîn de
di sala 1639 de têtе biderkevtin.

LOO Ji xwe re di vî warê hanê li nivîsta M. M. van Bruinessen bi zimanê Elmanî ve li
jêr navnîşana: .Agha, Scheich und Staat", r. 48 - 51, Edition Parabolis, Berlin 1989
bidin bidin bitemasekirin. Di nava van rûpelên hanê de tevaya siyaseta Iraqê û Iranê
dûr yanjî nêzîk têtin bidiyarkirin.

101Ji xwe re li Kovara Kadir, r. 4, jimara 11, sala 4, gulna sala 1972 de bide
bitemaşekirin, ya ku ji bala Partîya Demokratî Kurdistan di çapxana Taymis de li
Bagdadê de hatîye biderkevtin.

293

Bi eşkere ve û hêjîbêtir bi rast û durust ve ji bona Pîrê Hozanê Barzanîyê Rêberê Kurd him mebesta dewleta Iraqê jê re dihate biderkevtin û himjî jê re nêzîkbûna vêxistina şerê man û nernê ji bal dewleta Iraqê de li ser Kurd de dihate biderkevtin.

Dewleta Iranê û herwehajî Impiryalîya Emerîkî pir li ser van rewş û zînetên hanê bi agehdare ve dihatin biderkevtin. Him Şah û himjî Emerîkan pir bi başî ve ji xwe re didatin bizanîn, ku ew bi mebest û armancên xwe ve di Iraqê de bes û bi tenha ve di rêya vêxistina şer de di navbera dewleta Iraqê û Kurdan de dikarin bêtin bigihandin û wan bidin bicihanîn. Jibervêjî ve wan bes û bi tenha ve ji bona demekê destê alîkariyê ji bona piştgirtina şûreşê û Barzanî bi xurtî ve datin bidirêjkirin. Barzanî û Kurd jî bi neçarî ve ji bona liberxwedana man û nemana xwe ew alikarîyên hanê ji xwe re didatin biwergirtin. Piranîya piranî herî pir ji Kurdan di seranserî Kurdistanê de pişta Barzanî di wê siyaseta liberxwedana man û nemanê de

beramber bi faşîyên Efleqî ve didatin bigirtin.
Belê di girêdana vê peymana 6 avdara sala 1975 de di nava
Şahê Iranê û Sedam Husên de Iran û Impiryalîya Emerîkî bi carekê ve
deha bi baştir ve bi armancên xweyî danînî ve hatin bigihandin,"'
Belê bi diyar û bi lênerîrıeke tenikî kurt ve Sedam Husên û
Efleqîyên xweyî faşî bi armanca xwe ve di xistina Barzanî de û
herifandina şûreşa Kurd de hatin bigihandin. Lêbelê bi lênerîke piçekî
hurtir û wirdtir ve li ser serpêhatîyêrı miletan de û herwehajî li ser
mêjûwa diplomasî de ji bona girêdana peymanên wetov gewretîrin
kevtin ji wan re di encamê dawî de ji ware dihate bidîtin.
Herwehajî di morkirina encamê vê peymana hanê de kêrdarîya
zalbûna Sovyêtê bigir bi carekê ve him ji Iraqê û himjî ji seranserîya
Rojhilata Navînî de bi kevtina xwe ve date bidestpêkirin.
102Ji xwe re di vî warê hanê de li kovara EPN, Heft Nr. 9- ı0 / Oktober 1988,
Entwicklungspolitische Nachrichten, Österreich, bi zimanê Elmanî ve bidin
bitemaşekirin, ya ku li ser bergê wê de wêneyekî Pîrekî Kurd hatîye bibelavkirin û li
ser Wêne de bi tîpên gewre ve hatîye binivîsandin: ku "Kurd bi gorîyên Aşîtîyê ve
hatin biderkevtin."
294Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
----------~
Kurd û Barzanî ji herkesî bêtir bi vê peymana hanê ve zîyan bi
wan ve hate bikevtin û careke din ji nûve û bi neçarî ve destana
Kurdan di Kurdistana Iraqê de date bidestpêkirin.
Di vê peymana hanê de qazanc û berjewendîyên pir alîyan têde bi dijî

hevdû ve li binguhen hevdû de dihatin bikevtin, jibervêjî ve xwendekarîya vê peynama hanê û kêra wêna di mêjûwa kurdistanê û Rojhilata Navînî û kêra wêna de nebes tenê ji bona Welatperwerên Kurd û zanistvanan bi neçarî tête bidivakirin, hêjîbêtir herwehajî ne bes tenê bi pir giring ve ji bona Welatperwerên Ereb û Zanistanênê wêna ve tête biderkevtin; lêbelêjî wehajî û pêrejî ew ji bona Welatperwerên û Zanistvanêrı Turk û Farisî jî ve tête biderkevtin: jiber ku di ecamê dawî de bi hemû tirş, talbûn û destanên bi bê nimûne ve di mêjûwa xebata Kurdistanê de di nava van pêncsed salê derbasbûyî de di piştî şerê Çildêran der sala 15 14 de bi ser serên Kurdî hatî ve her û her vê peymana hanê bi pêşveçûna demê re di vî sedsalê me de bi neçarî ve li ser bingehên qanûnên jînê de ji bona bi nemankirina dewleta Iraqî ve dê bête bikarkirin.

295

Bi dawî hatina şûreşê ve

Di 6. 3. 1975 de di Konfırensê OPEC de li bajarê Cezair de Peymana Cezair di navbera Şahê Iranê Sedam Husên de hate bigirêdan. Şahê Iranê dev ji piştgiirtina Kurdan date biberdan û wî desteyên sipahên Iranî ligel çekên wanî giran de ji Kurdistanê di 7. 3. 1975de date bigişandin.

Di 8. 3. 1975 de sipahê Iraqê bi xurttirîn hêrîşa xwe ve ji bona ser Kurdan pê hate birabûn, ne bes tenê Kurdan dikarîbûn xwe li ber wê hêrîsa xurt de bidin bigirtin, hêjîbêtir wan dikarîbûn bi qehremanî ve wê hêrîşa sipahê Iraqê bidin bişikenandin; belam tevî vê bi serkevtina hanê jî ve ji Kurdan re hate bidiyarkevtin, ku li berxwedanên bêtir ji bona wan nema êtir bi serkevtî ve dihatin bidîtin.

Barzanî di 10. 3. 1975 de bangek bi birûskeke dawî ve ji bona Yekgirtina Dewletên Emerîkî ji bona piştgirtina Kurdan di mafeyên

wanî rewa de date binardin; belam banga wî ji bal yekgirtina Dewletên Emerîkî de bi bê bersiv ve hate bimayîn.
Ev birûska Barzanîyê hanê bi bangekê ve ji bona Kîsincer ve di raportê Payik de ji Tehranê de wetov hatîye binivîsan: "Tevgera me û miletê me li ser devê wêrankirinekê de têtе bidîtin...
Ho xwedanê berêz em din bihestkirin, ku Yekgirtina Dewletên Emerîkî beramber bi miletê ve
berpirsiyarîyek sincî û siyasî dide bihilgirtin."?"
Wetov Yekgirtina Dewletên Emerîkî destên xwe ji pişgirtina Kurdan mîna dewleta Şahê Iranê datin bikişandin û di 30. 3. 1975 de bi derbasbûna ji bona nava Iranê hate bineçarîkirin 104.
103Ji xwe re li nivista cercis Fethulah de: Serdanek ji bona mêja nêzik de, r. 2 16
bidin bitemaekirin.
104Ji xwe re bi dûr û dirêjî ve di vî babetê hanê de û herwehajî li ser pirsa Kurd û
Kurdistanê de li Kovara: International, Zeitschrift mr internationale Politik, 1/86,
296Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Barzanî birûskek ji bona serdariya Iraqê date birêkirin, da ku ew ligel hevdû de ji bona bidin bidan û bisitendin, da ku ew pirsê di nava xwe de bi şeveyekî aşitî ve bidin biçarekirin, belam bersiva vê birûskê jî nehate bidan.
Di pişti dîtina Barzanî li gel Şahê Iranê de Brazanî date
bidazanîn, ku ew dixwaze şer bi dawî ve bide bianîn.
Di nava çend rojan de liberxwedanê Kurd ji hev hate bikevtin û di despêka meha Cotana sala ı975 de bêtir ji 250 000 Kurd ji bona Iranê hatin bipr ..:'1hindekirin.

Belê şureşa Kurd û liberxwedana wan bi şer ve nehate bişikenandin, lêbelê şûreşa Kurd û liberxwedana wî bi şêweyekî siyasî ve hate bişikenadin û bikevtırı."'

Wien, Österrich, bidin bitemaşekirin. Ev Kovara hanê di salê şeş caran têtebiderkevtin. Di vê jimara hanê de bi carekê ve li ser: Die Kurden, Staatenlos in verbrantner Heimat, von Ferdinand Henerbichler -Kurd, bi bê Neşinvanîya Dewletêve di nava welatê xweyî sutarıdi de, ji bal Ferdinand Hênerbişler, hatiye binivîsandin.

105Ji xwe re di vî babetê hanê de li M. M. van Bruinessen Agha, Şcheich und Staat,
r. 49 - 50 bidin bitemaşekirin.

297

Kanî

Bi zimanê Kurdî

.1Mesud Barzanî, Barzanî û Tevgera Azadixwazîya Kurd, Kurd û Şûreşa 14
Tîrmeha Sala 1958, Kurdistan, di 15 befirbara Sala 1991 de bi zimanê Kurdî ve ji bal min de

.2Celîlê Celîlî de bi zimanê Rusî ve û wergerandin ji bona zimanê Kurdî ji bal Dr. Kawês Qeftan de di bin nav û nîşana .Kurdekanî Imperetorîya Osmanî de", Bagdad sala 1987 de bidin bitemaşkirin.

.3Dr. M. S. Cuma: "Sî sal li ser KSSE de -Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de", di 1O. 8 . ı986 ji bal Sikretarîya Komela Xwendekarên Kurd li Ewropa de, Ber1ina Rojava de hatîye

biçapkirin.
.4Ekrem Cemîl Paşa bi zimanê Kurdî ve: Dîroka Kurdistan
.5Feysel Debax:"Kurd û Kemenetewayetîyekanîtir li ser jimêrî salê ı977 da ,,-Kurd û Kêmanîyên tir li ser jimara di sala ı977 de-, çapxana Perwerde axlêva sala ı993 de
.6Jean-Jacques Rousseau de Peymana Civakî de bi zimanê Kurd ve ji bal min de
.7Hesen Şiyar di "Dîtin û Birhatinên min 1914 - 1983", çapxana Emîral, Libnan. Beyrût, ı993 de
.8Lenin de di Derbarê Çarenûsa Netewan de bi zimanê Kurd ve ji bal min de
298Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
.9Mihemed Mele Ehmed: .Xoybûn" de, wergerandina ji bal Keça Kurd de ji bona Kurmancî, çapa yekem, Şam, di 15. 1. ı993 de
.10Mihemed Mele Ehmed de bi zimanê Kurdî ve:"Peywendîyên Kurd û Ermenîyan" de, Wergerandina Keça Kurd, di 1. 9. 1994 de, Sûriya - Qamişlo de
.11li ser pirsa Kurd de li namilka wergerandî de ji bona Kurdî zaravayê soranî de ji bal Seed Ebdulah de, ya ku bi derîkî ve ji nivîsta Lazerêv tête biderkevtin. Ew nivîsta hanê, ya ku ew li jêr navnîşana:" Pirsa Miletan di nava Welatên rizgarîkirî de di Rijhilat de" tête bidîtin, bi zimanê rusî ve li Moskê de di sala 1986de hatîye bibelavkirin. Ev namilka wergerandîyî hanê di bin vê nav û nîşanê de"Ew hokaraney meseley Kurd pêkdênin"-Hokarîyên pirsa Kurd didin bipêkanîn- bi Kurdî ve bi zaravayê soranî ve hatîye biçapkirin. Li ser vê namilka hanê de ne dem û nejî cîhê çapê hatîye binîvîsandin.

Bi zimanê Erebî ve
.1Tevgera Azadîxwaziya Milîyî Kurd ji Barzanî tanî Mesud Barzanî, nivîsta duwem, ji bal Ebdul-Qadir Birîvkanî, çapa yekem, Qahire, Misir sala ı998 de
.2Celîlê Celî de bi zimanê Rusî ve û wergerandî ji bal Siyamendê Sêrtî de ji bona zimanê Erebî."Intifadet El-Ekrad -Serhildana kurdan- der sala 1880 de", Dar El-Katib, Berûd sala 1979 de
.3Cercis Fethulah bi zimanê Erebî ve: Serdanek ji bona mêja nêzîkde, Sutokholm sala 1998 de
299
.4Mohemed Mele Ehmed de "Rûpelên ji mêjûwa tevgera azadîxwazîyî welatîyî Kurd li Surî de", Beşê Yekem û Beşê Duwem, Bêrut, Libnan
.5Munzir Elmusilî de bi zimanê Erebî ve: "Ereb û Ekrad" -Ereb û Kurd-,Dar Elxusûn, Bêrûd 1986
.6M. S. Lazerêv di wergerandina zimanê Erebî de ji bal Dr. Ebdi Hacî de di bin navnîşana: "Pirsa Kurd ji sala 1917- 1923"
.7Kovara Kadir, r. 4, jimara ı1, sala 4, gulna sala ı972 de bide bitemaşekirin, ya ku ji bala Partîya Demokratî Kurdistan di çapxana Taymis de li Bagdadê de
" .8Sela El-Dîn de" di wergerandina Erebî de ji zimanê Inglîzî de ji bal Dr. Alî Madî, EI-Ehliye lilneşir, Bêrud 1986 de bidin bitemaşekirin.
.9Xal êt Muradyovêc Pêtyova de: "Ji Mêjûwa pêwendîyên Rus û Kurdan de", wergerandina rusî ji bona zimanê Erebî ji bla Dr. Ismail Hesaf de, -bi bê sal û cihê derkevtinê ve.-
ıo. Xebat bi zimanê Erebî ve, jimar 470, Ilona sala 1963 de
1ı.Xebat bi zimanê Erebî ve di jimara 493 de sala 1966 de

.12Xebat bi zimanê Erebî ve di jimara 499, befirbara sala 1967 de
.13Ismet Şerîf Wanlî de bi zimanê Erebî ve di bin nav û nîşana: "Cîhana Erebî û Cenga Ruzgarîkirinê di Kurdistana Iraqê de" , ya ku Ismaet Şerîf Wanlî ew li Siwêsra de di 28 meha çirya pêşî de di sala 1963 de dayite binivîsandin.
.14Zozik, Belavoka Rexistina Partîya Demokratî Kurdistan li Ewropa de bi zimanê Erebî ve, Jimara 1, mêjûwa 18. 1. 1975 de
300Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Bi zimanê Ingilîzî ve
8 .1 .1ailie Frser:Travels in Kurdistan ş Mesopotarnia" -Geştîyek di Kurdistan û Mêsopotamya de-, (Richard 8entley, New Burlington st, London 1840
.2A. M. Hamilton :"Road through Kurdistan" (2nd
•ed.), London
1958
.3Kovara .Africa, Latin Amerika, Asia Revolution, YoU, No. 4-5, r. 117 - 155, Lausanne, Switzerland 1963
.4Kurdica, Journal of Kurdish Affirs, Ne. 1, Julay 1968 de, London
.5Kurdistan" annual journal of K. S. S. E.-Kovara Kurdistan, Organê Komele Xwendevanên Kurd li Ewropa de-, Yol. XILI, 1969, London.
.6The Kurdish Journal, Vol. Il, September, December 1965, Pulished by the Kurdish Student Organization in the USA. Ev Kovara hanê ji bal Rêxistina Xwendevanên Kurd de di yekgirtin ên Dewletên Emerîkî de dihate biderkevtin.
.7The emergence of Kurdish Nationalism and the Sheikh Said Rebellion. 1880 - 1925, by Robert Olson, University of Texas Press, Austin, 1989

.8S. Losev û Y. Tyssovsky "The Middel East Oil Polecy", Progres Publishers Moscov 1984
.9Ismet ŞerîfWanlî:"The Kurdish Problem In Syria", January ı968
.10Ismet Serîf Wanlî de: "The Revolution of Iraki Kurdistan, Part 1,)From September 1961 to Desember 1963), Puplished by the
301
Committee for the Defense of the Kurdish People s rights,)Kurdish Representation) Apri 1965
Il. Ismet Şerîf Wanlî: "The Persecution of the Kurdish People by the Baath Dictatorship in Syria, 1968
Bi zimanê Elmanî ve
.1Ismail Besikçi de bi zimanê Elmanî ve di bin nav û nîşana: "Wir wollen frei und Kurden sein, Brief an die UNESCO ISBN- Verlag, Frankfurt 11984
~2Israel Intern de ji bal Ame Jörgensen, Militarverlag, VEB, r. 60- ,1 7Berlin 1984 de
.3Ferdinand Hennerbichler "Die Für Die Freiheita Sterben", Edition S., Verlag der Österreichen Staatsdruckerei, 1. Auf1age 1988
.4Kant de .Zum ewigen Frieden" -Ji bona Aşîtîya hergavî-, ya ku ew ji 1796 - 17800 hatîye binivîsandin, Verlag Philipp Reclam jun. Leipzig 1984
" .5Saladins Söhne" JI bal Günter Desch1er, Droemer Knaur, München 1983
.6Kovara: International, Zeitschrift für internationale Politik, 1186, Wien, Österrich
" .7Kurdistan zwischen Aufstand und Völker Mord" -Kurdistan di navbera sehildanê û Qirkirinê de-, Edittion Komkar, Frankfurt am Main 1991

.8Helmuth V. Moltke de di nivîsta wî de bi zimanê Elmanî ve li jêr navnîşana:"Unter dem halbmod -Erlebnisse in der alten Türkei- " -
302Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
Li jêr Nîvheyvê de, dîtinên min di Turkîya kevin de ji sala 1835-
1839de,Verlag NEUES Leben Berlin 1984 de
.9B. N. Ponomarjov de: "Der Sieg im Namen des Frieden", Verlag Progress, Moskau 1985 de, bi zimanê Elmanî ve
ıo. "Weltgeschichte", berge 8, VEB, Deutscher Verlag der Wissenschaft, Berlin ı966
ı1. .Weltgeschichte'' berge 6, VEB Deutscher Verlag der Wissenschaften, Berlin 1969
.12Weltgeschichte", berge 8, VEB, Deutscher Verlag der \Missenschaft, BerI in 1966
" .(1'Qesichte der Araber" -Mêjûwa Ereban-, bi zimanê Elmanî ve, ·Band 6, Akademie Verlag, Berlin 1983
Bi zimanê Firensî ve
.1Ismet Şerîf Wanlî lêgerandina bi zimanê Firensî ve: LA POPIL TION KURDE, "BOMBE A RETRDEMENT ET LES EFFETS SOCIAUX ET CULTURRELS DE LA REPRESSION Lausanne, mars 1999
Bi zimanê Farisî ve
.1GIya Çelebî bi zimanê Farisî ve "Kurd der tarîx Hemsayegan"de ,Siyahetnane GIya Çelebî, Wergerandina Faruq Kîxosrewî, Intişarat Selah El Dînê, çapxana Sepher, Tehran 1364
**

REWŞA ÊZIDIYAN

EUROKURD HUMAN RIGHTS
JI AWIRA MAFÊ MIROVAN Û EWLEKARIYÊ VE

REWŞA ÊZIDIYAN
Rêzehevpeyvîn
E- Pirtûk
EuroKurd Human Rights
Mijdar 2008, hejmar: 4
Malper: www.eurokurd.net
E-post: eurokurd@comhem.se
EuroKurd Human Rights
EuroKurd Human Rights dezgehek însanî ye û li ser pirsa mafê mirovan li Kurdistanê dixebite. Dezgeh bi çi hêz û îdeolojiyan ve ne girêdayî ye, ji awira aborî ve serbixwe ye. Xebata xwe li ser bingeha rojnamevaniya lêkolînî pêk dihêne û pirsa mafê mirovan li ser esasê qanûn û peymanên navnetewî dişopîne.
EKHR rapor û nûçeyên li ser pirsê berhev dike û yên giring dike kurdî, swêdî û ingilîzî. Paşê ji bo ronîkirina raya giştî bi rêya malpera xwe belav dike.
EuroKurd bi dezgehên navnetewî /netewî yên însanî re têkiliyan datîne.
”Zarathustra News” ji bo berhevkirina nûçeyên li ser pirsê, di xizmeta EuroKurd Human Rights ê de ye.
www.eurokurd.net li ser bingeha armancên EuroKurd ê weşana xwe dike. Naveroka malperê giraniya xwe li ser pirsên mafê mirovan li Kurdistanê û ewlekariyê ye.
EuroKurd Human Rights
Stockholm
Dosya Taybetî
Tehdîta Jenosîdê û Êzidî

Êzidî delîla herî mezin ya hebûna me ne. Gelek nirxên me yên netewî: Zimanê me, dîroka me, adet û toreyên bav û kalên me, bi orîjînalîteya xwe gihandine roja me.

Di qonaxên dîrokî de, gelek qûrban dane. Ev salek e, êrîşên hovane li ser wan zêdetir dibe. Bi planên neînsanî, nirxên me, nîşana hebûna me, gav bi gav ber bi tunebûnê ve dibin...

Em, niqaşa pirsê ji awira ewlekariyê û mafê mirovan ve pir giring dibînin. Di vê dosya taybetî de, em ê dîtinên şexsiyet û dezgehên cewaz li ser pirsê pêşkêşî we bikin.

Mijdar 2008

EuroKurd Human Rights

Naverok

- Sernivîserê Lalishê û nivîskar Mecîd Heso:
Divê Serok Barzanî xwedî li soza xwe derkeve 4-7
- Dr. Ismail Beşikçi:
Parastina Êzidiyan wezîfeya Hikumeta Herêmê ye 8
- Serhan Isa:
Şingal Kurdistan e 9-13
- Serokê Enstîtuya Kurdî ya Brukselê Derwêş Ferho:
Jenosîda Êzidiyan tê plankirin 14-16
- Ji Komela Nivîskarên Kurd ya Amedê Arjen Arî:
Ku kurd hebin… 17-20
- Ji Federasyona Êzidiyan Nivîskar Loqman Bariş:
Gotina “Êzdî Kurdên resen in” têr nake 21-22
- Seroka Federasyona Komeleyên Kurdîstanê Li Swêdê Şermîn Bozarslan:
Çanda Ezidî Çanda Kurdan ya herî kevnare ye 23
- Rêvebirê Enstîtuya Kurdî ya Stockholmê Serkan Brûsk:
Heta ku Êzidîtî hebe dê zimanê Kurdî hebe 24-25

- Serokê Komela Çandî ya Êzidiya li Mûsilê Prof. Dr. Ali Seedo:
Mafê reng û olên cewaz li Iraqê di xeterê de ye 26-27
- Ji Komîteya Rêvebir ya Komkarê Salihê Omerî:
Kurdistan bê Êzîdî nabe 28
-Gerînendeyê Zarathustra News ê rojnamevan Gabar Çiyan:
Divê Êzidî di îdareya devera xwe de desthilatdar bin 29-31
Sernivîserê Lalishê û nivîskar Mecîd Heso:
Divê Serok Barzanî xwedî li soza xwe derkeve

Gabar Çiyan

- Em dizanin tu nivîskarek naskirî, sernivîseriya malpera Laliş dikî, gelek caran li ser mafê êzîdiyan dinîvisînî... hûn dikarin, xwe bi xwendevanan bidin naskirin: Mecîd Heso kî ye?

Mecîd Heso: Bi germayî ya şoreşa îlonê re, şoreşa ku gelê Kurd bi serkêşiya rehmetî Mistefa Barzanî li başûrê Kurdistan li dijî dagîrkerî û sitema hikûmeta Bexda serî hilda, li jêr dengê top û firokeyan sala 1967 an li gundek biçûk jêre digotin Şêx Xidirê (10 km başûrê parêzgeha Duhok) hatim dinayê. Heyanî 10 saliya min, lingek li şikefta pişta malê û lingê dî li kolanên gundê kavilkirî û derbederiyê, dayika min bi xêzanî di maleka kurdperwer û pêşmerge de ez xwedî kiri. Di nav tirsê, birsê û pirsê de min zaroktiya xwe wenda kir.

Rejîma Iraqê sê car (1964, 1974, 1988) bi hêceta ku xelkê gund bi şoreşa kurdî re ne, gundê me şewitandiye. Cara dawîn bi zor em di komelkgeheke ku ji 11 gundan pêkhatî de binecih kirine.

1974 Min bawernameya Pola yekemîn a dibistana seretayî di dibistana şoreşê de, li geliyê sereşka (navê geliyekî ye li çiyayê pişta gundê me)

wergirt. 1983 an de xwendina navendî li gundê Şariya. 1986 Dibistana amadeyî (lîsa) li Duhok.
1990 bawernameya bekaloryus ji fakûlteya aborî û rêvebiriyê a zanîngeha Bexda.
2007 bawernameya magister (Master) ji zanîngeha Azad ya Lahayi (Dan Haag) li Holandayê wergirt û niha ez doktoriya xwe li ser kartêkirina kirîza wuze (energy) û guhertina avûhewayê li ser werara astê aborî û bazirganiya navneteweyî amade dikim.
Derheqa karê çand û perwerdeyi yê ez xebatên min wisa ne: 1991 Redaksiona kovara Pêla Serbest, Duhok. 1992 Endamê Liqa Pêşeng ya xwendekar û ciana li sinûrê her dû parêzgehan, Duhok û Mûsil,û berpirsê komîteya navçeya bajarê Duhok. 1994 redaksiona Kovara Laliş, duhok. 1998 sekreterê rojnameya Kurdistan, Elmaniya. 1999 Xwediyê Kovara Kurdistana Îro, Elmaniya. 2001 Sernivîserê Malpera Lalish.de di Internetê de. 2008 serokê fakulteya lêkolînên kurdî li zanîngeha Azad li Elmaniya.
Endametiya min: 1984 Endamê tîpa şanoya Şoreşvan, Duhok. 1987 Endamê Sendîkaya Hunermendên Iraqê. 1990 Endamê sendîkaya Jimêryaran (Muhasebkaran), Duhok. 1992 Endamê yekêtiya nivîskarên Kurd, Duhok. 1994 Endamê desteya rêvebir ya bingeha Laliş, Duhok. 1998 Endamê Enistîtûya Kurdî ji bo lêkolîn û zanistê, Elmaniya. 1999 Endamê PEN a Kurd. 2004 Endamê komîteya rêvebir ya Mala Êzidiyan, Berlin. 2006 Endamê Navenda Anfal û Helepçe Kurdistan (CHAK) û berpirsê komîteya Berlin.
- Armanca malpera Lalish çiye?
Mecîd Heso: Armanca Malpera Lalish komkirin û arşivkirina çand û folklora beşek dêrîn ji civaka Kurdistanê ye, ew civak ya ku bi sedên salane li jêr rikêfa dagîrkeran dinale, dagîrkerên ku bi ti şêweyî naxwazin

gelê Kurd rastiya xwe nas bike, rastiya ku bingeha civakan di afirîne, gelan li ser lingan disekinîne û di be şengisteya avakirina welatên bi hêz.

- Hejmara Êzîdiyan li cîhanê û Kurdistanê çiqas e?

Mecîd Heso: Bi hêsanî mirov nikare hejmarek dirust bide, ji ber ku serjimêriya welatên ku Êzidî lê dijîn neserjimêriyek bawer pêkiriye, lê li gorî çend çavkaniyên nefermî tê texmîn kirin ku hejmara Êzidiyan li cîhanê yek Miliyon be û li Kurdistanê 650 - 700 hezar Êzidî hebin.

Mixabin li Bakûrê Kurdistanê ji ber zilm û zora dewleta Turk, Êzidî li ser cî û milkên xwe nemane piraniya wan koçberî Europa bûne û niha tenê nêzîk 400 kesan li bakûrê welat mane. Li Başûrê Kurdistanê jî ji tirsa Islama siyasî û radîkalan, Êzidî ji welat bar dikin.

- Ji kerema xwe hûn dikarin kurte analîzekê "li ser nasnameya etnîkî û baweriya olî ya êzîdiyan" bikin?

Mecîd Heso: Dînê Êzidiyan yek ji dînên kevnareye li rojhelata navîn, ji ber dijwariya dîrokê û ew karesatên bi serê Êzidiyan hatîn, ti nivîsên kevin jî li ber dest neman, ku li ber roşnaya wan em karibin bi dirustî salekê ji destpêka dînê Êzidiyan re destnîşan bikin. Li roja îroyîn tiştê li ber destê me hejmarek textên devkî ne, ku zanayên aynî bi şêweyek veşartî ew di singa xwe de parastine, ezdayetî ji nifşekî bo nifşê dî aniye, dema mirov naveroka van textan (qewlan) û rêwresim, tîtal, rewişt û mantalîteya Êzidiyan dide ber hev rastî hin pirsan tê, bersiva wan jî girêdayî şirovekirin û analîzekirina:

Nasîn û şirovekirina rolê Tawisîmeleke, ji hêla felsefî, dîrokî û xwedawendî ve.

Bingeha felsefeya cejnên Êzidiyan. Naskirina bîrwbaweriyên berî bûna Isa ku li rojhelata navîn dahir bûyîn, mîna mîtrayî, zerdeştî û htd.

Ji bo ku mirov van sê xalên li jor analîze û şirove bike pêwîste di nav efsane, wêjeya devkî ya Êzidiyan, qewl, Beyt û bîrûbaweriyên ayinî yên

wê serdemê de, li xelekeyên windabûyî yên zincîra dîroka Êzidiyan bigere.

Peyîva Êzidî wate êzdayî (Xwedayî) , ji Ezda(Ez + da) ango Xweda (Xwe + da) ramana xwe digire, yekemîn milet ku li ser rûyê erdî bawerî bi yektayî û paye berziya Ezda anî Êzidî bûn. Dînê Êzidiyan bingeha xwe ji xweza yê digre, li cem Êzidiyan her fenomenek xwezayî weke rojê, Heyvê, Baranê û htd, xwedawendê xwe yê taybet heye û hemû li jêr ferwara Ezda kar dikin.

Av, ax, ba û agir Çar elementên girin li cem Êzidiyan

Di Qewlên (tekstên ayînî) yên Êzidiyan de hatiye gotin:

Xwedevandê me rehmanî
Çar qism li rûyê dinê danî.
Yek ave, yek nûre, yek axe, yek jî agire… (1)
Yan :
Padşayê minî cebar e,
Ji durrê efrandibûn çar e,
Ax e, û Av e, û Baye, û Agir e. (2)
Yan :
Ku kinyat pê zeyînî Axê û Avê û Bayê û Agirî
Qalibê Adem jê nijinî.
Çar qismet tek hincinî ,(3)

Baweriya Êzidiyan ji xwezayê destpêdike li her çar werzên salê bi guherîna av û hewayê re cejnên Êzidiyan hene. Li beharê cejna sersê salê, li payizê cemayîya laliş, li sivistanê cejna rojiyan û cejna çileyî, li havînê ecjna çileyê havînê, mayîna van cejna di heman rojê de ji demsalê wateya girêdana bîrwbaweriya Êzidiyan ya bi Xwezayîbûn û xwezayê re nîşan dide

Êzidî bawer dikin ku xêr û şer dihundirê her mirovekî/ê de heye, „Mirov bi xwe ji du hêzên têkilî pêktê, di bedena wan de başî û xirabî hêlîna xwe çêkirine. Mana wê yekê jî ew e, ku her Êzîdiyek perçek ji Tawisî-Melek pê re heye“ (Êzîdîtî berî dema Şîxadî 1).

„Naveroka felsefa dînê Êzdîyan xwedênasiyê, heqyê, îman û axretê, efirandina dinê, mirinê, jîyanê, qencîyê, xiravyê, rastiyê, nerastiyê, qewat û bûyarên xezayê, derheqa sirra Melek û Milyaketada ne.

Li bal Êzdîyan hebandina here mezin û bilind Xweda ye. Şaheda dînê Êzdîyan da ew fikir pir zelal dîhar dibe. Ew hema wa jî dest pê dibe: Şaheda dînê min yek Xweda ye.(Ezdîtî bawarya heqyê, re'mê û Xwedênasyê ye)

Sebaret nasnameya Êzidiyan ya etnîkî jî, piraniya lêkoler û zanayên dîrokî li wê baweriyê ne ku Êzidî kurdên resenin û beriya 1400 salan ango berî hatina Îslamê ya kurdistanê, Kurd li ser ola ezdayetiyê bûn. Heke em iro li cî û warên Êzdî lê dijîn binêrin wê diyar be ku tenê li Kurdistanê Êzidî hene, zimanê wan Kurdîye û tenha dîne li çîhanê ku bi kurdî nimêj duhayên xwe dike.

- Di dîrokê de, komên ekstrem herdem êrîş birine ser Êzîdiyan. Bi buyerên qirkirinê rûbirû mane. Îro rewşa wan çawa ye?

Mecîd Heso: Dîroka Êzidiyan bi dirêjiya dewranên bûhirtî şahidiyê ji gelek tepeserî û malwêraniyê re dike, eve jî gişt hewlên tunekirin û jinavbirina nijadî bûn (jenosid), bi van hewlan re bi sed hezaran kêsên bêguneh ji ber dînê xwe giyanê xwe ji dest dane, komkujî û derbederî li dijî Êzidiyan bikar hatiye, bi taybet li serdemê Osmaniyan.

Çavkaniyên dîrokî metirsîtirîn wêneyên li dijî ji navbirina Êzidiyan (firmanan) berçav dikin, firmana herî dawî li dawiya sedsal 19 an li ser destê General Omer Wehbî paşa hat li darxistin.

Pêwîste ji bîrnekin ku dirindetirîn firmana kujtin û tunekirinê li dijî Êzidiyan li serdestê mîrê kore (Mir Mihemed Rewandizî) pêkhat, di vê hewê de pişti talankirina deverên ku êzidî lê nişteci, bi hezaran jin û keçên Êzidiyan girtin û bi xwe re birin bi dehhizaran jî kesên bêguneh qelandin û ji cî û warên wan hatin dûrxistin.

Johannes Düçting li ser dîroka êzdiyan agahiyên di dema Osmaniyan de dide û bi dûr û dirêjî basê kokujiyên ku li dijî Êzidiyan pêkhîn dike (Dîroka Kurdên Êzdî)

Di baweriya min de ne kurdistan bê Êzdî dibe, ne Êzdî bê Kurdistan dikarin bijîn, mîna Îslamê ji boy Ereban, wisa jî Êzdî ji boy Kurdistanê giringin, ji ber ku ev dîn li ser vê axê Xwedê naskiriye û ji boy vê axê jî 72 firman bi serî hatine, ji dema ku hêrişên ereban li jêr navê ayinê islamê gihaye Kurdistanê û bi şûr beşek ji Kurdan islam qebûl kirî û heyanî niha bo parastina Nasname, çand û zimanê kurdî Êzidî ser û malê xwe didin.(Êzdî di paşeroja Îraqê de)

Roj bi rojê rewşa Êzidiyan li Îraqê xerab dibe, mixabin hikûmeta herêma Kurdistanê pîlanek ber bi çav nîne ku rê li ber vê rewşê bigire, ji ber vê yekê rojane bi dehan Êzidî ji welat koçber dibin, heke bi zûtirîn dem rewşa Êzidiyan li başûrê Kurdistanê baş nebe, metirsî heye ku Êzidî koça giştî bikin.

„Şovenîzman nefamiya berpirsên Kurdistanê ji xwe re kirin derfet, bi gelek şêweyan xwestin Êzidiyan tevlî lîstikek gemarî bikin, ji boy ku ne aramiyekê li deverên ser bi pagrafa 140 ve durist bikin, li Şêxan xwestin û Êzidiyan ew pîlan pûç kir, mixabin li Behzanê di meseleya Diwayê de Êzidiyan şaşiyek dîrokî kir û delîvek zêrîn da destê islamîstên radîkal di encam de 26 karkerên bê guneh li Musil hatin kuştin û vê damargirjiyê di nav bêdengiya her dû hikumetan de (Bexdad û Hewlêr) bûyera Şengal bi

xwe re derxist holê“.(Komkujiya Şengal di yekemîn selveger de hat ji bîrkirin).

- Ji bo ku Êzîdî karîbin ji awira ewlekariyê bêne parastin û di nava aştiyê de bijîn, pêwîstiyan wan bi çi heye?

Mecîd Heso: Pêwîstiya Êzidiyan bi piştevaniya hikumeta herêma Kurdistanê heye, heke raste Êzidî Kurdên resenin gereke îro xwedî li wan derkevin û bi gişt hêza xwe herêmên Êzidiyan biparêzin., Piştî bûyera Şêxan 16.02.2007 û bûyera Şengal li 14.08.2007 koçberiya Êzidiyan zêde bû.(Piştî bûyera Şêxan koçberiya Êzidiyan zêde bû), bi bûyera Şêxan re 11 mal û komeleyên Êzidiyan nameyek ji serokê Kurdistanê re şandin lê heyanî niha jî bersiva nameya wan nehat dayîn vê yekê rê li ber spekulationan vekir, bi kujên Gir Ezêr û Sîpa Şêxidrê jî cesaret ji vê bê xemiyê girt.(Nama Hevkariya mal û komeleyên Êzîdiyan li ser bûyera Şêxan).

Her kesê gefên kujtinê li Êzidiyan xwarin gereke bê dadgehkirin û sizadan, ji bo ku baweriyek li cem wan çêbe dinava aştî û aramiyê de li ser cî û warên xwe bijîn, Mele ferzende li bajarê Akirê di xutbeyeka xwe de wekî Mela yehiya yê Mizûrî fetwa ya komkujiyek nû li dijî Êzidiyan da, newezareta Ewqafê û nehukûmeta Kurdistanê heq û hesab pê re kir. (http://de.youtube.com/watç?v=Z8OhhRdDtZw)

- Ji bo rêkûpêkirina mercên jiyana Êzîdiyan li Îraqê, bicîhanîna hêvî û daxwaziyên wan, ji dezgehên însanî û dezgehên wisa di nava EU û USA de, li benda çi ne?

Mecîd Heso: Niha Piraniya deverên Êzidiyan girêdayi hikûmeta navendî ne, ango ew deverin yên ku hikûmeta herêma Kurdistanê û hikûmeta navendî ya Îraqê nakokî li ser hey, ji ber vê yekê ez li wê baweriyê me heta ku benda 140 ji destûrê îraqê çareser nebe asayiş li herêmê berqerar nabe. Ji ber vê yekê mercên jiyana Êzidiyan girêday rewşa

siyasiye. Îro li Îraqê ne tenê nakokiyên olî û etnîkî yên hundirîn hene, belkî dewletên derdor jî naxwazin rewşa Îraqê aram be, her yekê agendeyên xwe hene û li gor berjewendiyên xwe tevdigere.

Ciyê ku Êzidî lê dijîn deşte û ji teroristan re armancek hêsane, her demê ku bixwazin dikarin rewşê tevlîhev bikin.

Deverên Êzidiyan yên li jêr deselata hikûmeta herêma Kurdistanê jî tûşî arîşeya îslama siyasî bûne, mixabin sîstemê rêvebiriyê li başûrê Kurdistanê xetimiye û roj bi roj xerabtir dibe, ew hêviya Êzidî li bendê di nav lepên îslama siyasî de di sekeratê (Koma yê) de ye.

Êzidiyan ev metirsiye gehande hikûmeta kurdistanê û gelek soz wergirtin, lê pêngav nehatin havêtin, ji mecbûrî Êzidiyan li gelek welatên Europayî û USA meş li darxistin, paşî ev metirsî di raporekê de bişêweyek girseyî pêşkêşî perlemana Europa kirin. (KURDÊN ÊZÎDÎ LI PAYTEXTA AVRUPA BRUKSELÊ)

Êzidî li bendê ne ku USA li îraqê xwedî li sozên xwe yên di derbarey parastina mafên hindikayiyan de derkeve.

- Ji bo parastina wan, domandina jiyana çandî û olî hêvî û daxwaziyên we ji Hikumeta Herêma Kurdistanê çi ne?

Mecîd Heso: Serok Mesûd Barzanî di gotinek xwe de dibêje “ yan resentirîn Kurd Êzidîne yan jî miletek nîne bi navê kurd“ , Êzidî hêvîxwazin serok Barzanî xwedî li van gotinan derkeve û rê li ber heqareta li dijî Êzidiyan li başûrê Kurdistanê tê meşandin bigire.

Li gorî raporek mafê mirovan tê gotin rojane 23 Êzidî ji Îraqê derdikevin, ger ev hijmar rast be wate her sal 8395 ÊzidÎ koçber dibin. Pêwîste hikûmeta herêma kurdistanê bi cidî li ser vê meseleyê bisekine, kosp û tegereyên rê li ber hemwelatiya yeksan (wekhev) û rast û dirust digirin ji holê rake.

Bi dîtina min heta niha serkirdayetiya Kurdî li başûrê Kurdistanê, zimanekî hevbeş dinavbera xwe û Êzidiyan de peyda nekiriye, ew rê û pirên heta niha PDK û PUK di navbera xwe û Êzidiyan de avakirîn de, di nav lepên çend kesên kefçînas û Xwed nenas de hilweşyan.

Pêwîste di demek kin de Konferansek li başûrê Kurdistanê were li darxistin û egerên koçberiya Êzidiyan ji Kurdistanê bên giftûgo kirin, eger na rojek wê were poshmani fêde nake û rewsh wê ji destên gisht aliyan derkeve.

EuroKurd Human Rights – www.eurokurd.net

Dr. Ismail Beşikçi:

Parastina Êzidiyan wezîfeya Hikumeta Herêmê ye

Gabar Çiyan

- Birêz Dr. Beşikçi, weke ku hun jî zanin, di van demên dawiyê li dijî Êzidiyan hejmarek êrîş pêk hatin. Armanca êrîşan, gav bi gav tunekirina Êzidiyan, jiholêrakirina çandekî ye. Hilweşandina baweriyek kevnare ye ku rehên xwe kur berdane erdê welatî. Hedefa wan: Tunekirina nîşan, delîl û koka me kurdan e.

Ji bo parastina Êzîdiyan, pêşxistina çand û baweriya kevnare, wezîfeyên me çi ne, divê çi bê kirin?

Dr. Ismail Beşikçi: Êzîdî Kurd in. Baweriya Kurdan ya berî peydebûna ola Îslamê hemêz dikin, diparêzin. Êzidî, berî jidayikbûna Mesîh bi sedan salan li jora Mezopotamyayê bicîh bûbûn û li ser xaka xwe jiyana xwe didomandin.

Êzîdî di gelek qonaxên dîrokî de, ji ber êrîşên Kurdên olîslamî, mîrên Kurdan û ereban mexdur bûne, neheqî li wan hatiye kirin. Lê Êzidiyan, herdem, ji bo Rizgariya Netewa Kurdistanê, ka rû xebat kirine, di şer de cîh girtine, û şehîd dane.

Pir giring e ku Gelê Kurd li ser bingeha vê zaniyarê nêzî Êzidiyan bibin, wan nas bikin. Pêwîst e Gelê Kurd bi awayekî sîstematîk, bi zanabûnên piralî û kur li ser welatperwerî û fedekariya Êzidiyan û giringiya parastina çand û ola kevnare bêne ronîkirin...

Divê em dema peydebûn, û pêşketina Îslamê bînine bîra xwe: Dema ku xelkê bi şurê zorê dikirin misilman...

Di demek wisa de, parastina nirxên Netewa Kurd dihate çi wateyê? Li hemberî zordarî û tadayiya baweriyên biyanî, eks û israra parastina nirxên Netewa Kurd dihate çi wateyê?

Divê em li ser rastiya van pirsan kur bibin, bi zaniyariyê nêzî pirsê, anku Êzidiyan bibin...

Pêwîst e cihên Êzidiyan tevlî sînorên Herêma Kurdistanê bibe. Laleş di nav sînorê Herêmê de ye. Êzidiyên Şexanê, ji awira parastinê ve, „ji aliyê êrîşên ji derve û komplo û planên li dijî wan“, di xeterê de ne.

Ji bo ku Êzidî karîbin baweriyên xwe bi azadî bidin domandin, pêwîstiya wan bi aramiyê heye. Divê ewlekariya cihê wan xurtir bibe, li wir rewşek azad pêk were. Divê Rêvebirên Hikumeta Herêmê vê yekê bibînin...

Pêwîst e ji bo pêşxistin û xurtkirina aborî û civaka Êzidiyan polîtîkayek pêk were. Divê ev polîtîka, weke wezîfeyek giring ya Hikumeta Herêma Kurdistanê bê dîtin.

Êrîşên neteweperestên ereban li dijî Êzidiyan herku diçe zêdetir dibin. Ew dixwazin Kurdan weke sucdar nîşan bidin û şûpheyên li dijî Kurdan zêde bikin.

Di van mehên dawî de, hejmarek êrîş li dijî Mesîhî û Asuriyan pêk hatin. Divê armanca êrîşan di çarçoveya hatiye qalkirin, bêne nirxandin.

Divê Kurd li hemberî lîstik û komployan pir şiyar bin...

Pir giring e, û pêwîst e Hikumeta Herêma Kurdistanê û Gelê Kurd bi peyv, beyan, û çalakiyên xwe ispat û nîşan bidin ku ew, bi Êzidiyan re ne,

piştgiriya wan dikin. Her wisa ew piştgiriya xwe ji bo Mesîhiyan jî bi erênî nîşan didin.
EuroKurd Human Rights – www.eurokurd.net
Serhan Isa:
Şingal Kurdistan e
Gabar Çiyan
- Em te ji Komela Kaniya Sipî û xebatên li ser Êzidiyan nas dikin. Ji kerema xwe re, xwe ji xwendevanên me re bide nasîn. Serhan Îsa ki ye?
Serhan Isa: Di sala 1974 an de li Rojavayê Kurdistanê gundê "Alareşa" ji dayîk bûm. Min, xwendina seretayî li gund bi dawî anî, paşê û bi sedema xwendinê li bajarê Tirbespiyê akincî bûm, hetanî sala 2000 an.
Di sala 1993 an de min dest bi nivîsandinê kir. Di hindek kovar, rojname û malperên Kurdî û Erebî de nivîsî. Di sala 2000 an de koçberî Elmaniya bûm. Di sala 1997 an de dîwana xwe ya pêşî bi navê “Dûrbûna te dest pêka” helbestê ye derxist. Di 2001 î de pirtûka helbestan bi navê “Gula mijê”, "Xalid Hisên" wergerandin ji zimanê Erebî derxist. Sê (3) pirtûkên min ji bo çapê amade ne.
Sala 1993 an li gel hindek rewşenbîrên Kurdên Êzidî Komela Kaniya Sipî damezirand.
Ji salên 1990 î, di 16 saliya xwe de tevlî xebta siyasî ya tevgera kurdî li Sûrî bûm.
Ji sala 2005 an ve Malpera www.kaniya-sipi.de bi rêve dibim. Ez li zanîngeha Denîmark beşê Ragihandinê dixwînim.
Xebata min bêtir di warê wêjeyê de ye, (helbest, daneheva û berhevkirina kevnetorê kurdî, Lêkolîn li ser helbesta kurdî ya nûjen).
- Armancên Komela Kaniya Sipî çi ye?
Serhan Isa: Mirov dikare wisa bi rêz bike:

1. Kar ji bo anînecemhev, parastin û xizmeta Êzdîyatiyê; berevanî di ber wana de di hemî waran de li gorî karînên komelê; kar û hewildan ji bo rê li ber girtina ewan kiryarên nemerovan e yên ku li dijî Êzdiyan têne kirin, mîna derxistina Êzdiya bi darê zorê ji welatên wana, ku ji layê desthiladarên ewan welatên ku Êzdî têde dijîn ve tête bikaranîn.
2. Kar ji bo ku Êzdî di ewan welatên ku têde dijîn de, û mîna hemî Ayînên din bi azadî û bi zimanê ku ewna dixwazin seqa, girdi, diwa û dirûzên xwe bikarbînin; her weha mafdan û serbestkirina vekirina dibistanên Olî ji bo xwendina ayînê Êzdî li ser bingehin birayetî û lêborînî; û ji kîsî ewan welatên ku Êzdî têde dijîn de, her weha serbestkirina li darxistina ahî û cejnên ayînî, û rojên cejnan bibin rojên veysandina fermî ji bo agirt, xebatkarên sivîl û lekerî, yên bawermendên vê ayînê, di hundirê welat de.
3. Kar ji bo yekgirtina peyva Êzdiyan, di riya bihêzkirin û nûjenkirina têkiliyan di navbera Êzdiyan xwe bi xwe de ji layekî ve, û ji layekî dîtir ve di navbera Êzdî û rêxistin, û aliyên olî û merovanetî di cîhanê de di riya danûstandin û rawergirtinê de, ji layekî dîtir ve; Kar ji bo ku Ola Êzdî ciyê xwe di rêza ayînên cîhanî de bigre.
4. Kar ji bo danehev, nivîsandin û nûjenkirina çand û keleporê vê Olê, ji bo parastina hîmên Olî, her weha afrandina lêkolînan di derbarê hemî hêlên Olî û jiyana xelkê vê Olê de, civakî, rewenbîrî û dîrokî û wergerandina van berheman bo gelek zimanan, û belevkirina van berheman bi rengê pirtûk eger derfet hebin.
5. Nivîsandina lêkolîneke Ciyografî û dîrokî li ser Êzdiyan bi gitî û li ser Êzdiyên baûrê rojavayê kurdistanê bi tayîbetî ku bibe jêder û çavkaniyek, û damezirandina axan ji komelê re li ciyên ku Êzdî lê dijîn de.
6. bi hêzkirina rola jinê daku bikaribe ciyê xwe yê surityan e mîna Mêr di civatê de bigre, di riya pikdariya wêna di hemî bizavên cor bi cor de mil

bi mil li gel mêr. Her weha li xwedîderketina li biçûkan û perwerdekirina wana bi êweyekî tenduristyane, li gor derfetên berdest. Vekirina hemî derfetên zanînwergirtinê li pêiya gêncan, ji bo sînorkirina derketina ji rêza civatê.

7. Alîkariya xwendevan û agirtên Êzdiyan yên ku ji ber sedemên aborî nikarin xwendina xwe bi dawî bînin, her weha alîkariya malbatên Êzdiyan yên belengaz û li gor karînên komelê di dema nuha de .

8. Birêkûpêkirina komîteyekê ku biêt bi Parêzerekî Elman re peywendiyê çêkê (an jî bêtir) ku ji Êzdîyatiyê bi tayîbetî û jî pirsên mafxwestin û mafwergirtina mafê penaberiyê bi kelemperî agahdar be; daku li nik dadgehên Elman dubarepirskirin û lênerîna pirsên ewan kesên Êzdî yên ku hîna mafê mana li vî welatî bi dest bê xistin...

- Ji kerema xwe re, analîzekî li ser buyera Şingalê û buyerên paşê pêk hatin ji me re bike.

Serhan Isa: Eger Şingal ne Herêmekê Kurdî be, wê li ser rûkê vê zemînê welatek bi navê Kurdistan tune be.

Şingal an jî keleha berxwedanê wek ku Êzdî wê bi nav dikin, mezintirîn herêma Êzdiya ye. “Jimara nişteciyên wê bêtir ji 400 hezar kes e, anku rêjeya Êzdiyan li Şingal 80% î ye ". 1

" Jimara nişteciyên Şingal di sala 1075 de bêtir ji 30 hezar kes bûn û jimara xaniyan di salên 1394 an de wek ku " Demlûcî " dibêje bêtir ji 35 hezar xanî bûn," 2

Nişteciyên Şingal bi giştî Kurd in, wek xak jî parçeyekî bingehîne ji nexşeya Kurdistanê, " ku ew bi xwe dikeve rojavayî kurdistana başûr, 120 km ji aliyê rojava ve ji Mûsil dûr e".3

Şingal ji sînorê xwe yê rojava ve dikeve ser sînorê dewleta Sûriyê, ji aliyên wê yên din ve jî hozên Ereba ne.

Şingal wek cografiya ji dewletên cîranê Iraqê re, bi tayîbet yên hevsînor mîna Sûriye, ji roja roj de ciyê pirs û tirsê ye.
Şingal, Tilefer, Zemar xaniqîn, Başik û Bazan, Şêxan û Kerkûk, ji bo tevgera siyasî ya Kurdî li Başûrê Kurdistan pirseke pir mezin in, û di seranserê pêvajoka têkoşîna xwe de bal kişandiya ser van herêman û bi xurtî doza zîvirandina wan ser nexşeya Kurdistan kiriye.
Lê divê em ji bîr nekin ku dijminên kurdan jî her timî ji bo vê dozê bi dekûdolab bûn, û hetanî vê gavê jî qet bi tu awayan rê nadin ku ev navçe û herêm bi nexşeya Kurdistanê ve bêne girêdan.
Ji bo Kurdan jî eger hat û ev proje têkçû wê ziyaneka mezin bighîne Gelê Kurd wek netew û wek xak.
Piştî serhildana 1991 î, gelek herêmên Kurdî ji bin destê deshilatdariya "Bexda" derketin. Di nav de jî gund û navçeyên Kurdên Êzdî bi tayîbet li Parêzgeha Dihokê, û hêdî hêdî Êzdî wek Ol, Netew di hemî hêlên jiyanê de, di Iraqê û Kurdistanê de geş bûn.
Piştî rûxandina rêjîma Bexda ya faşist di 09 Nîsana 2003 an de, Kurdên Êzdî jî mîna hemî pêkhatiyên Iraqê bi tam û bîna azadiyê şad bûn, û bi qeftên gulan pêşmergeh pêşwazî kirin.
Lê hêdî hêdî ev azadî û Iraq bi giştî li wan bû zindaneke vekirî.
Bûyera ku di 14.08.2007 an li Herêma Şingal " Sîba Şêx xidrê û Girê Izêr " qewimî, û di encamê de bêtir ji:
311 Pakrewanan
304 Birîndaran
36 Sêwiya
3050 Xaniyên ku zirar dîrina
300 Xaniyên ku ji kok ve hilweşiyana
170 Firoşgehên ku ji ko ve hilweşiyana 4

Kurdên Êzîdî li şûn xwe hiştin. Teror; di hizir, pilan, şêwe, dem, cî, û alavanên xwe de pir nuh bû.
Ji bo min bijatina dema bûyerê 14.08. ciyê pirseka mezin e?!.
Piştî bûyerê parêzerê Mûsilê "Durêd Muhemed Keşmûla" doz li hikûmeta Iraqê kir, ku Herêma Şingal wek herêmek wêran ilan bike, û destê alîkariyê bi zûtirîn dem ji xelkê deverê re dirêj bike. Li ser vî esasî Encumena Wezîran yekşemba di pey bûyerê ev biryar sitandin, û 10 Milyon Dolar ji derverê re terxan kirin.
Lê mixabin ev alîkarî hetanî vê gavê bi rengekî rêk û pêk û pêdivî negihişte xelkên deverê?!
Herweha miletê Kurd li başûrê Kurdistanê bi tayîbet û li tevaya Kurdistanê û welatên ku Kurd lê dijîn bi dilsozî û alîkariyeke pir mezin beşdarî bûyerê bûn.
Ji layê din ve jî, helwesta Serkirdayetiya Kurdî bi tayîbet Serok Berzanî û Telebanî ciyê serbilindiyê bû, lê diyare ku damûdezgehên Herêmê û Iraqê bi erkên xwe yên pêdivî ranebûn û li helwesta serkirdayetiyê nebûn xwedî.
Nerazîbûn, daxwiyanî û helwestên ku di derbara bûyerê de hatin dayîn, ciyê serbilindiyê bûn, û di asteka pir hêja de bûn.
Bûyer ji hêla Koşka Sipî, Vatîkan, Al-Azher, û gelek dewlet, hêzên siyasî, saziyên mafên merovan, rewşenbîr û nivîskaran ve hate şermezarkirin.
Lê dîsa di praktîkê de evan dewletan destê alîkariyê ji xelekên deverê re dirêj nekirin, bêguman heta radeyekê merov dikare vê nepûtepêdanê fam bike, ji ber îro di Iraqê de hêza herî desthilatdar Emerîka ye, her weha ev wezîfe di pileya yekemîn de ya Hikûmeta Merkezî û Herêmê bû.
Ji layekî din ve, divê em tevger û xebata mal, komel û saziyên Êzdiyan jibîr nekin, têkoşîna ku van saziyan û tevaya Êzdiyên cîhanê nîşan da ciyê

rûmet û serbilindiyê bû. Li gor karîn û derfetên xwe hetanî weka roja îro jî, di vê xebatê de beşdar in.

Gelek siyasetmedar, nivîskar, û hêzên siyasî, dema bûyerê bi cîbecîkirin û pêkanîna xala (140) ji destûra Îraqê ve girêdan. Lê piştî bişûndedan û gîrokirina bicîkirina vê xalê û helwesta Hikûmeta Herêmê ya heta radeyek sist, diyar bû ku armanc ji wisa mezintir, ferehtir û dijwartir bû.
Bersiva Hikûmeta Herêmê li ser rexneyên ku piştî qewimîna bûyerê hatin ji wan re, li ser nerabûna wan bi erk û wezîfa parastina hemwelatî û herêmên kurdî, bersivek pir seqet û ne saxlem bû.
Di hindek analîzeyên din de ev komkujî bi bûyerên (Şêxan- 14-15-16.02.2007), (Behzanê 07.04.2007), û (Musil 22.04.2007) girêdan.
Bûyer wek hizir, "hizra teroryane" di bingeha xwe de, di warê kuştin û tolhilanînê de, bi tayîbet di Iraqê de, piştî rûxandina rêjîma Sedam a faşist, hizreke nuh bû, ji ber ku armanca van " grûp û hêzên kuştinê " vê carê ew bû, ji ortêhilanîna miletekî bi ser xwe bû, "ferman"a tunekirina olekê bû?!
Bûyer di şêweyê xwe de, pir hovane bû, pir bi badnor û ziyan bû, li wê radeya ku merov têxîne nava pirs û gumanên pir xeternak û balkêş de, ku bûyerek bi vî reng, deng û ziyanê wê hêzên pir mezin li pey hebin.
Bûyer wek komkujî, “ferman”, a parçeyekî bingehîn ji miletê Kurd, û li ser astê xwe yê Kurdî wek Dewlet, Medya, û Siyaset, merov dikare bêje ku pûtepêdaneka mezin û pêdivî pê nehate kirin?!.
Ev yek jî bêguman ciyê pirsê ye, her weha bû sedema nexweşiyeka pir mezin di gewdê Kurdayetiyê de, û encamên wê yên nêgatif hêdî hêdî derdikevin holê.
Dibe ku di kurteanalîzeyekê de merov nikaribe berawerdiyekê di navbera Jenosîda Şingal (14.08.08 an) Hîroşîma (06.08.1945) Naxazakî

(09.08.1945) û Helebça de (16.03.1988) bike, lê bi herhal bûyera Şingal di hemî astan de nekêmî van hersê bûyeran bû.

Hetanî weka vê kêlîkê bûyerên ku li herêmên Kurdên Êzdî qewimîne, mîna (Şêxan- 14-15-16.02.2007), (Behzanê 07.04.2007), û (Musil 22.04.2007) ne ji layê Hikûmeta Herêmê ve û ne jî ji layê Hikûmeta Merkezî ve lêkolînên mezin, pêdivî û pisporane li ser nehatine çêkirin?!

Kurdên Êzdî di seranserê dîroka xwe de hêminî, bawerî û xweşî ji derdora xwe, bi tayîbet ji birayên xwe yên Kurdên misilman nedîtine; lê piştî rûxandina rêjîma "Sedam", Kurdên Êzdî jî mîna tevaya pêkhatiyên Iraqê bi tam û bîna azadî, aramî û aşîtiyê şad bûn, û bi derdora xwe re derbasî qûnaxeka nuh bûn, û hewil dan ku mil bi mil Iraqa û Kurdistana dahatû ava bikin û pirên baweriyê di navbera xwe û hevparên xwe de ava bikin.

Ev rewş jî berê merov dide çend pirsên giring:

1- Ev nebawerî ji kur tê, sedemên wê çi ne?

2- Pêkhatiyên Kurdistanê wê karibin li gel hev di Kurdistaneka azad û hêmin de bijîn?

3- Têkiliya van pêkhatiyan bi hev re di çi astê de ye?

4- Biryara siyasî ya Kurd dikare çi bandorê li guhertina vê rewşê bike?

5- Ji salên 1991 an ve Kurd xwedî Deshtilatdar in, gelo xeml û temtêla Kurdistana dahatû jî wê bi vê rengê be, wê bi van êşa be?

6- Ciyê Kurdên Êzdi wê di Kurdistana dahatû de jî bi vî rengî be?

7- Di Kurdistan û destûreka xuro Misilman, de wê ciyê Olên din li kur be?

Û gelek pirsên din ku gereke roj berî rojê siyasetmedar û rewşenbîrên Kurd li ser bixebitin.

Mixabin encama van sedemên ku me li jor anîn ziman, û encama danûstandina ne wekhev, ne durist, ne birane a ku ji hêla Hikûmeta Merkezî û Hikûmeta Herêma Kurdistanê ve bi Êzdiyan re hate kirin, û tê

kirin, bûne sedema rûxandina van pirên baweriyê, bûn sedema parçekirina miletê Kurd, bûn sedema sedên nexweşiyên din, yên ku di bingeha xwe de wê ziyanên pir mezin û xeternak bighînin pirsa Kurdî di seranserê Kurdistanê de.

Ji layekî din ve eger em bala xwe bidin Nexşeya siyasî ya rojhilata navîn em dê bibînin ku di wê herêmê de pir hêzên hevpeyman yên ku li dijî hebûna miletê kurd û pirsa wî ya netewî kar dikin hene.

Lê pirs ew e:

Gelo hêzên siyasî yên kurd li hember van hêzên hevpeyman çi kar û tedbîran dikin?

Civaka Kurdî hetanî çi radeyê ji dekûdolabên van hêzan re hişyar e.?

Rewşa civaka Kurdî a navxweyî hetanî bi çi radeyê saxleme û dikare xwe li ber van dekûdolaban bigre?

Bandora hizra Islamî ya radîkal li civaka Kurdî di çi astê de ye?

Xetera vê hizra radîkal li ser pêkhatiyên Kurdistanê çawaya û wê çawa be?

Şêweyê têkiliyê di navbera Hikûmeta Herêmê de û hemwelatiyê wê de bi çi rengî ye?

Nêzîkbûn û famkirina Hikûmeta Herêmê ji daxwaz, metirsya û mafên Êzdiyan û hindikayên din yên kurdistanê re çawa ye?

Ji Hikûmeta Herêmê tê xwestin ku bi awayekî cedî li ser van pirsan û gelekên din jî rawest e û bi zûtirîn dem çareseriya ji wan re peyda bike, û hevparên xwe yên vê xakê bi tenê nehêle.

Di hilbijartinên yekemîn yên Perlemana Iraqê (komela nîştimanî) di sala 2004 an de, di nav lîsteya hevpeymana Kurdistanê de, sê kursiyên Êzdiyan hebûn, her weha di wezareta ku di dema serokwezîr " Iyad Al-Alawî " de hatî çêkirin de, wezaretek şiklî bi navê wezareta dewletê ya karûbarên civaka sivîl dane Êzdiyan.

Di salên 2005 an û 2006 an dema hikûmeta serokwezîr „ Ibrahîm Al-Ceferî“ de, ev her sê kursiyên Perleman û yê wezaretê jî ji Êzdiyan hatin sitandin, tenê di nav lîsteya hevpeymana Kurdistanê de navekî Êzdî hebû! Her weha „Tevgera Êzdiyan ya çaksazî û pêşverû„ a ku Hikûmeta herêmê bû sedema jidayîkbûna wê kursiyek bidestxistin.

Mafbinpêkirina û jiguhavêtina mafên Êzdiyan û pêkhatiyên din ne tenê di Hikûmeta „Bexda“ yê de berdewam dike, belê li hêla Hikûmeta herêma Kurdistanê jî rewş hîna xerabtir û dijwartir e.

Kurdên Êzdî di perleman û hikûmeta herêmê de xwedî sê kursî û du wezaretên şeklî ne.

Hêzên siyasî yên ku îro Iraqê birêve dibin, qîma xwe bi vê yekê jî ne anîn, û dîtin ku ev mafên ku pêkhatiyên Iraqê yên kêmhijmar, bidestxistine pir e ji wan re, îdî perlemana Iraqê bi piraniya dengan biryar dan ku „benda 50 „ ji yasaya hilbijartina encumenê parêzgehan rakirin.

Li ser vê biryara Perlemana Iraqê a dijwar ku di derheqa hinikayiyên xwe de sitandiya cîhan bêdeng nema û dengên bi hêz ji nivîskar, rewşenbîr, hiqûqnas dezgehên mafên merovan û civaka sivîl bilind bûn.

Di vê derbarê de şandeka Kurdên Êzdî bi serokatiya Mîrê Êzdiyan li cîhanê Mîr Tehsîn Beg di 13.10.08 an de, berê xwe dane avahiya Perlemana Kurdistanê û ji layê berêz Ednan Muftî serokê Perlemana Kurdistanê, serokê komîteya nivîsandina destûra Herêmê û çend berpirsên din ve hatin pêşwazî kirin.

Mîr Tehsîn Beg û şanda li gel daxwaz li rayedarên Hikûmeta Herêmê kirin ku li Kurdên Êzdî û hindikayiyên din xwedî de derkevin û mafên wan di destûra „Herêmê“ û ya „Bexda“ yê de bêne çespandin.

Ji hêla xwe ve Serokperlemanê Kurdistanê soz da şandê ku bi cidî li ser daxwaz pêşniyaz û gazinên wan rawestin, û got ku Kurdên Êzdî parçeyekî

bingehînin ji netewa Kurd û em qet bi tu awayan rê nadin tu hêzan ku mafên wan binpê bikin.!
Her weha hidikayên din jî yên mîna Xiristyanan bêdeng neman û serî li Hikûmeta Herêmê dan, û doza maf û parastina xwe kirin.
Tê zanîn ku di dema dawî de, teroristan di bajarê Mûsilê de gefên mezin li Xiristiyan xwendin, û bêtirî 15 kesan jiyna xwe ji dest dan, û bêtir ji 800 kesî koçber bûn.5
Her weha Kurdên Feyilî jî her timî ji danûstandina Hikûmeta Herêmê û ji ya Merkezî jî bi gazin in.
Ev rewşê û ev nerazîbûn û gilî û gazinên van hidikayiyên Iraqê bi giştî ne ji valahiyê tên.
Û eger rewş bi vî rengî berdewam bike, dê di pêşerojê de teqîn û encamên pir nexweş, pir bi ziyan bi xwe re bîne, ku êdî tu kes nikaribe li ber jan û hêrza wan xwe bigre.

Jêder û çavkanî:

1- raporta miletên dibin gefê de (GfbV)
2- Kîfah Mehmûd, Şingal ji salên (1947- 2002) semînar.
3- Heman jêder
4- Agahdariyên komîteya Hawarê 22.08-26.08.2007 an
5- Daxwiyaniya çak 17.10.2008

EuroKurd Human Rights – www.eurokurd.net
Serokê Enstîtuya Kurdî ya Brukselê Derwêş Ferho:
Jenosîda Êzidiyan tê plankirin
Gabar Çiyan
- Hêja Derwêş M. Ferho, em te ji xebatên Enstîtuya Kurdî ya Brukselê nas dikin. Hayê mej i çalakiyên we yên hêja heye. Em dixwazin hûn hinekî qala xwe bikin. Derwêş M. Ferho ki ye?

Derwêş M. Ferho: ji Mizîzex (Midyad), ji sala 1977 û vir de li Beljîka dimînim. Di 1978 de tev 6 hevalên xwe TÊKOŞER, Yekîtiya Karker û Xwendekarên Kurd li Beljîka damezrand. Ev rêxistin bû hîmê Enstituya Kurdî ya Brukselê (1989). Xwendina bilind (ne zanîngeh) li bajarê Leuven qedand. Ji 1996 de serokatiya Enstituyê dikim. Sê berhemên min yên helbestan, tev nivîskar û lêkolînerên cihê jî bi qasî deh berhemên li ser pirsên cihê yên Kurdan hatine weşandin. Berpirsiyariya giştî ya kovarên Les Kurdes (Frensizî) û De Koerden (Nederlandî) dikim. Her du kovar jî yên Enstituya Kurdî ya Brukselê ne.

- Bi taybetî li Sengalê û li deverên din yên Kurdistanê Êzîdî dibin qurbana êrîşên hovane. Ewlekariya wan li ser xaka xwe tune ye. Dîtina te ji bo parastina vê çanda netewî ya kevnare û parastina Êzidiyan çi ye?

Derwêş M. Ferho: Zor û zilma li ser civaka Êzîdiyan ne tiştekî nû ye. Demeke dirêj e û diçe heta bi destpêka guhertina ol û rayedariya (îktîdar) li nav Kurdan. Sitara Êzîdiyan, ji gelek sedeman, di hember êrîşên ji dervayê civaka wan de, di bin ti perran de pêk nehat. Bi teybetî, di demên ku Kurdan bi awayekî giştî û berfireh ber bi çûna Îslamê de çûn. Her çiqasî îslamiyet li Kurdistan bi hêz ket û her çiqasî rayedarên herêmê Îslamiyet mîna ola fermî pejirandin ev zor û zilm li ser Êzîdiyan zêde bû. Lê ev nayê vê wateyê ku bes hêzên Îslamî û yên nêzî wan êrîş birin ser Êzîdiyan. Gelek civakên xwedî olên din jî Êzîdî êşandine.Êzîdî behsa 72 (vê dawiyê jî ya Sengalê kete ser) fermanên li serê wan qewîmî ne dikin. Ez heta niha nizanim li ser çi esasî 72 fermanan dibêjin. Lê tiştê ku ez zanim, fermaneke berdewamî li ser vê civakê heye. Yek be, yan 72 be! Ev civaka xwedî ol û dîrokeke kevnare qurbanê teybetmendiyên xwe ye. Li ser axa xwe, li nav welatê xwe, di jiyana xwe de êrîş têne ser û bi qelandinê tê tehdîdkirin. Roj bi roj hê zêdetir dikeve ber kokbirrînê. Ev kokbirrîn ji aliyê olî ve, ji aliyê civakî ve, ji aliyê dîrokî ve, ji aliyê etnografîk ve û ji aliyê war

ve pêk tê. Êzîdî bi xwe neçûne ser xaka kesekî din. Kesên din, civakên din têne ser wan. Talaneke berfireh li ser serê wa ye. Ev kokbirrîn û talana mezin organize kirî ye. Hem di nava civakên derdorê de û hem jî ji aliyê fermî de ev kokbirrîn û talan serberdayî ne. Fermî û ne fermî, bi qanûn û bê qanûn ev ferman li ser serê wan e. Loma jî nave wê jenosîd e!

Di ware ewlekariyê de ez du alî difikirim.

Yek; çavnebarî û êrîşên li ser Êzîdiyan ji aliyê olên din. Di sedsalên dawîn de bi teybetî ji aliyê hêzên Îslamî. Eşîr û dewlet bi tewrên xwe vê civakê yan didin ber zor û zilmê, yan jî li hember zor û zilmê bi qedera xwe re dihêlin. Heq û hiqûqê esîr û dewletan ji bo vê civakê di gelek dem û waran de nameşe. Êzîdî ji heq û hiqûq bê maf in. Meriv dikare vê yekê bişibîne rewşa giştî ya Kurdan ya neteweyî. Ez bawer nakim ku kesek, civakek yan dewletek nizanibe ku Kurd ji bo Kurdbûna xwe têne perçiqandin. Lê ev kes, civak û cîhan li hember vê zor û zilma li ser Kurdan bê deng dimîne. Êzîdî jî di eynî rewşê de ne. Ew ji bo ol û teybetmendiyên xwe têne qirkirin. Her kes jî vê dizane. Lê kî li wan xwedî derdikeve? Kî li ku li heq û hiqûqê wan dipirse?

Du; Êzîdî xwe bi xwe şirîkê vê rewşê ne. Di bin nave xweparastinê û ji tirsa hundakirina ol û teybetmendiyên xwe, xwe di qalikê xwe de kilît kirin. Ne di ware olê de û ne jî di warê ramanê de xwe nuh kirin. Li ber xwe nedan. Dijminê ol û civaka xwe bêminet nekirin. Ji bo kêşe zêde nebin xwe bêdeng kirin!!!

Derdorê wan ew îzole kirin, fetwa li ser wan xwendin, ew ji bo berjewendiyên ola Îslamê bi gelek tiştan tewanbar kirin, av û nanê wan heram kirin, civaka wan kirin pêkenok, ziman û adedên wan gunehkar kirin, qedexe kirin, bi bîr û baweriya wan lîstin... Ev qas tişt jî bi zanebûn hatin kirin. Ev siyasetek bû. Stratejiyeke ji bo ji kokbirrîna Êzîdiyan, ya demdirêj bû.

Êzîdiyan çi kir? Ev qas tişt bi dil yan jî bê dil, qebûl kir. Serî nehilda. Dema meriv li dîrokê dinêre çi dibîne? Ew ol û ramanên ku ji derve re vekirî ne, ji minaqeşê re vekirî ne û zelal in, pêş dikevin. Mezin dibin. Bi mezinbûna xwe re jî bi hêz dibin. Ji ber çi sedemê olên Îslamê û Xiristiyanan li her kuçe û herêmên cihanê mizgeft û dêrên xwe ava dikin, lê Êzîdiyên me heta niha li yek cî mabeteke xwe ava nekirin? Çima niha dest pê nakin û mabetan ava nakin?

Di her mizgeft, dêr û xwendegehan li seranserê cîhanê hînbûna van her du, û gelek olên din jî, mimkin e lê bes ola Êzîdiyan veşartî ye? Rewş hatiyê vê qasê ku êdî 99 % Êzîdiyan jî ola xwe nas nakin. Bes dizanin ew êzîdî ne. Lê naveroka Ezdahiyê nizanin. Ev bi serê xwe trajediyek e û gunehekî mezin e. Kî ji vê yekê tewanbar e? Êzîdî bi xwe!

Civaka Êzîdiyan, ji sedema kilîtkirina deriyan, teng ma. Bêzar ma. Bê goman ma. Hêvîşkestî bûn. Xwe bê xwedî û bêhêz dîtin. Ji xwe û rastbûna xwe, ji hêza xwe û bikêrbûnên xwe bawerşkestî bûn. Xwe bê heval û bê dost dîtin.

Eger di ciyê pêwîst de li ber xwe dabane û mineta kesekî nehildane rewş weha nedibû. Eger ew di dema dihatin îzolekirin de, li ser fetwa û ferman dihatin xwendin bi cesaret rawestabane rewş weha nedibû. Eger di dema ku hin ji wan misilmanên şîrheram dihatin malên wan yan li ciyekî din av û nanê wan û destkuja wan nedixwar û venedixwarin gerek ji wan re negotibane, kerem bikin hun serê vê heywanê jêkin. Bila birçî û tî mabane. Gerek e ji wan re hatibane gotin; nan û ava me ji nava te paqijtir e. Ne nan û av, ne destkuja me heram e. Dilê we ne paqij û heram e.

Di warê ziman de Êzîdî Kurdê herî paqij man. Kurdên ku misilman bûn, heta bi zimanê xwe, bi zimanê xwe re jî bîr û ramanên xwe, orf û adedên xwe jî guhertin. Lê Êzîdiyan ev nekir. Bi zimanê xwe axaftin, duayên xwe, limêjên xwe, şîn û şahiyên xwe bi zimanê xwe, bi Kurdî kirin. Ev hêjayî

gotinê ye ku meriv pê serbilind e. Lê çi kêmasî di warê ziman de hate kirin ? Ew jî ew e ku ew ziman dîsa ji sedema tirs û gomanan nehate nivîsîn. Ev jî bû sedema ku bi hezaran tiştên Êzdahiyê, ez bi rehetî dikarim bêjim Xezîne, hunda bûn. Ewê careke din werin dîtin û bêne nivîsîn pirseke mezin e?

Ji bo parastina Êzîdiyan li tevayê herêmên Kurdan û dervayê welêt, divê merov çi bike? Em çawa dikarin vê çanda kevnare xurttir bikin?

Heta niha, Êzîdiyan werger di navbera xwe û Xwedê de pêwîst nedîtine. Rasterê ew dikarin bi zimanê xwe, bi Xwedê re diyalogê bikin. Ev serbilindiyeke mezin e. Ne Erebî, ne Turkî, ne Parsî û ne zimanekî din ji me re lazim e ku em duayên xwe, limêjên xwe, li ber Xwedê bikin. Zimanê me Kurdî pirr xweş e û Xwedê jî bi Kurdî ji me baştir dizane.

Bi bir baweriya min divê Êzîdî bighine wê qenaetê ku kesek serê kesî naxwerêne. Divê ew xwe bi xwe serê xwe bixwerînin. Ew tê wateyê ku ew xwe baş organîze bikin. Dubendîtiyên nav xwe rakin. Di bîr ramanênên xwe de reforman pêkbînin. Mîna çira ku derdorê xwe ronahî bike xwe li derdorê xwe belav bikin. Wan kilîtên kevnare bişkînin û biavêjin behreke kûr. Qedr û qîmetê ol û teybetmendiyên xwe heşkere li ser meydana zanyariyê razînin û bikin mijara lêkolînan. Di warê civakî de xwe li hev kom bikin. Ji xwe êmin û zelal bikevin nava civakên din. Bi şik û goman nemînin. Ji xwe bawer bin. Ji aliyê ronakbîrên Kurdan jî tiştên pêwîst ku meriv bike; Divê em ol û teybetmendiyên Êzdahiyê zengîniya xwe bibînin. Ji serî heta binî, dua û qewlên Êzîdiyan li ser orf û adedên me Kurdan in.

Hundakirina Êzdahiyê di nava Kurdan û Kurdistan de pejirandina xweguhertineke ne li rê ye. Di vê rewşê de li Kurdistan pejirandina asimilasyioneke ber bi Îslamê de ye. Li Ewropa û derên din pejirandina asimilasyona ber bi Xiristiyanîzmê ye.

Ne ku ez hember ol, bîr û baweriyên din im. Her kes di bijartina bîr û baweriyê de azad e. Lê ji bo me Kurdan pêwîstiya zanînê heye ku Êzdayetî bîr û baweriyeke bi teybetî ji nav me Kurdan rabû ye û xwezayî ye. Em ji bo çi vê xezîna mezin hunda bikin û ola Ereban, yan oleke din bibijêrin ê pê bijîn ?

EuroKurd Human Rights – www.eurokurd.net

Ji Rêvebiriya Komela Nivîskarên Kurd ya Amedê Arjen Arî:

Ku kurd hebin…

Gabar Çiyan

- Em te bêhtir ji cîhana te ya dewlemend, pir reng û fireh, i helbestên te yên bilind nas dikin. Her wisa di rêvebiriya Komela Nivîskarên Kurd li Amedê de jî xebata te wek rêvebirê têkiliyên bi derve re didome.

Ji kerema xwe re, qala xwe ji me re bike. Arjîn Arî ki ye?

Arjen Arî: Arjen Arî di sala 1956'an de, li herêma Omeriya, li gundê Çalê hatiye dinyayê. Di sala 1979'an de Enstituya Perwerdeyî ya Diyarbekirê Beşa Zimanê Tirkî qedand. Weke gelek şa'ir û nivîskarén kurd wî jî bi tirkî dest bi helbésté kir. Di sala 1976é de li Nisébîné ji ber belavkirina belavokeké hate girtin. Wé demé polisan dest danîn ser helbestén wî yén bi tirkî û kurdî. Qasî hefteyeké di hepsé de ma. Ew berdan, lé helbestén wî taa niha di mexzena Dadgeha Nisébîné de hepsî ne. Di gel, ku weke cara pêşîn kovara Tîrêjê de helbestên wî weşiyan tét zanîn, ya rast, helbesta wî ya ewil di belavokeke ku li heréma Mérdîn hate belavkirin de weşiya. Ew helbest ji sé malikan/beytan pék dihat. Malikek jé ev bû: Du mirin kirin mahne,rakirin ling Nisébîné/Xewa sibé bela kirin, avétin nav tirs û xwîné

Bi dû 12é Îloné de ew li welét ma, helbestén wî di kovarên li derveyî welét; wekî Berbang, Kurdistan Press, Nûdem, Çira, Pelîn û Rewşenê de hatin weşandin. Di sala 1992é li navçeya Nisébîné li ber deriyé mala xwe

rastî érişeké çekî bû. Birîndar rakirin Nexweşxaneya Zanîngeha Dîcleyé. Ji wé bûyeré de li Amedê dijî.

Di sala 2004é di nava demazrénerén Komeleya Nivîskarén Kurd de cih girt, hé jî di réveberiyé de Berpirsé Tekiliyén/alaqatan e.

Arjen Arî ji bilî kovara W, Peyv; di rojnameya rojane bi kurdî, Azadiya Welat de her heftî di quncika bi navé 'Erxewan' de, di malpera Diyarnameyé de jî her heftî di quncika bi navé 'Agirdank' de, û carinan jî bi nivîsén xwe beşderî Malpera Amîdakurd dibe.

Berhem

- Ramûsan min veşartin li geliyekî Helbest,Weşanên Avesta, 2000
- Ev çiya rûspî ne Helbest, Weşanên Avesta, 2002
- Destana Kawa Helbest, Weşanên Elma, 2003
- Eroûtîka Helbest, Weşanên Lîs, 2006
- Bakûrê Helbestê/Antolojiya Helbesta Bakûr,Wş.Y.N.Kurd,Duhok,2007

. Şérgele, Helbest,Weşanén Avesta,2008

. Çil Çarîn,Helbest,Wş.Enstîtuya Kurdî ya Amedé(ev behrem li ber çapkiriné ye)

- Ji kerema xwe re, dîtina xwe li ser Êzidiyan û parastina vê çanda kevnare bînine zimên...

Arjen Arî: Kaniyên li ser axa Mezra Botan, ên ku ji hezarên salan û vir ve de ji binê erdê derbûne û bi herîkana ava xwe ya zelal, tezî, şîrîn… ev ax şên û şîn kirine, û kirine ku libeke genim bibe deh, bibe sîh; û her cure kulîlk, her cûre pincar; dêlî, devî, dar şîn bibin, şaxan xwe pertew pertew berdin û cembek cembek fêkî bidin şênewar û nişteciyên xwe; roj hatiye sor sor herikî ne, roj hatiye bi xem, bi mitale, û têrkeser ponijîne, pêjinîne li dû kiryar û rûdanên li der û dora xwe…

Her qasid, xweş ne xweş ragihînerê mizgînekê ye.

Û ev qasid bi taybetî ji nava xelkê xwe rabûne, bi zimanê xwe; xwe, peyama xwe ragihandine a'mê.
Mûsa yek ji wan e, ku bi devê Xwedayê xwe wahd dabû ku qewmê wî bide pey, qewmê xwe bibe welatê herî aram, bi berke, bi roj û robar… û bi adan…
Cihû ji lewre, welatê xwe bi navê 'axa ku Xweda wahdî wan kiriye' bi nav dikin.
Nevê wî welatî jî İsraîla Mezin e.
Û bav û kalan me gotine, 'Xweda ku bide bi elba mezin dide'!
Dan/dayîn yek ji taybetî û xasî û comerdiya Xweda ye di her pirtûka ayînî de.
Li gorî Zend Avestayê jî Xweda/Ahûra Mazda/Xwediyê şev û rojê 16 herêmên bihûştîn bexşî Zerdeştiyan/Aryaniyan kiriye.(1) Û li ser wê axê kerî kerî sewal, ref ref teyr û tilûr…kanî û robar, dar û daristanên mişt fêkî, dêliyên heft ber û heft team…
Welatê Rojê ye ew welat!
Yê ku gotiye 'Welatê Rojê ' ji van axan re, çi xweş gotiye.
Xweş gotiye, belam ew welat, ev welat welatê ku Ahur'ê xwediyê avê, yê hewayê, yê axê û yê rojê bi dilovanî bexşî nişteciyên wê yên qedim: Aryaniyan kiriye, heta ku rûberû nebûye bi êrîşên hovane, lawirane û dirinde yên artêşa islamê, roj her roj bi hilatinê re bişiriye li van axan, û agirê pîroz pêt bi pêt germahî daye hûr û gir dilê mirovan…
Lê…lêbelê heta kengî?
Heta vê nameyê, vê nameya xelîfeyê ereb yê îslamê Omer îbn- el Xetab dişîne ji Şahînşahê Aryaniyan Yazgird re:
……
''Di demên berê de, hûn desthilatdarê nîvê cîhanê bûn. Lê belê neha bala xwe bidê ku çawa roja we reş dibe. Li hemû eniyan arteşên we têk diçin

û welatê we li ber hilweşandinê ye. Ez destnîşan dikim, ji bilî ku hûn bi me re îtîfaqê bikin û bibine musulman, tu çareya we nîne. Her weha, divê tu ji yek Xwedayî (ALLAH) bawer bikî û wî bihebînî.(2)

Benda li jorê, bendek e ji nameya Omer îbn- el Xetab e (634-644) a ku dişîne ji Şahînşahê Aryaniyan Yazgird'ê (Yezdgird,Yezdgur) di dema Sasaniyan de li ser textê desthelatê rûniştî; ku wî û qewmê wî vedixwîne ser 'reyê rast'!

Ji nameya Yazgird diyar e, berî nameya Omer arteşa misilmanan bi navê Allah, şûr bi dest, berê xwe dane qewmê Arî.

Nameye Omer bê bersiv namîne.

Yazgird'ê Aryanî –ji naveroka nameyê dixuye, bi hêrz û kerbeke pirr- vê nameya li jêr bi nivîsevanê xwe didi nivîsandin û rêdike ji xelîfeyê xwedêgiravî remza adaletê Omer'ê îbn-el Xetab re:

"Bi navê Ahura Mazda, Afirînerê Giyan û Zanist ê!

Di nameya te ya herî dawî de, bê naskirin, bêyî ku tu zanibî em bi çi bawerin tu daxwaz û emir dikî ku em bawerî bi xwedayê te "Allah-Û-Akbar" bînin û ola îslamê bipejirînin.

……..

Ji bo me xerîb e ku tu xelîfê eraban î û çewa dibe ku xelifê ereban hewqas nezan e ku ji ola me ne haydar e

……..

Em, gelên Aryanî bi hezarên salan li vî welatî bi kultur û hunera xwe rojê pênc caran ji yek xwedanekî re dua û îbadetên xwe pê?kê? dikin. Di nav rastî, dostanî û hevalbendiyê de li vî welatî, me ala RAMANÊN PAK, PEYVÊN PAK Û KIRYARÊN PAK her dem berz girtiye.

Lê hûn?

Hûn û hevalbendên we, gerokên li çolan, wek mar û gumgumokan, ji kulturê bê par, hûn hê jî zarokên bê guneh keçan bi saxî binerd dikin.''(3)

Name terê xwe dirêj e.
Yazgird di cihekî nameyê de Ereban bi talenkeriyê, şelînkariyê, rêbiriyê, û hemû tiştêndermirovî tewanbar dike û wisa berdewamiyê dide nameyê: ‘……..Şerm û heya we Ereban nîn e. Hûn Ereb, serê zarokên Xweda jê dikin, dîlên şer dikujin, tecawuzê jinan dikin, zarokên qîzin zindî binerd dikin, karwanan dişêlînin, komkujiyan dikin, xelkê direvînin û diziya malên wan dikin, dilê we ereban ji kevir e.

…….
Ka bêje! Piştî van kiryarên we yên bi qirêj û gemar, çewa dibe ku tu me vedixwînî ser rêya rast? ‘’(4)
Di serdema dêrîn de, gava ku Xwedawend pirrbûn, meriv bihizire têderdixe/têdigihêje çima Ares, Înanana, Îştar, Zews…berîzîne hev, pevçûne, şer rakirine di navbera xwe de…
Lê di dema qewmên ku bi saya serê Brahim Xelîlê me berê xwe dane yek Xwedayî û jê re xûz bûn, çima gelo her qewmî- bi taybet û xasma Ereban- bi ‘şûrê Xweda’ berê xwe dan qewmên din?
Hê jî bi qasî ku her ol ji texma xwe dibêje Xweda yek e, bêşirîk û bêheval e; her ol, xasma rayedarên olî bi fereseteke ku Xwedayê xwe di ser Xwedayê yê din re bigirin, tevdigerin.
Weke ku ji nameya Yazgird jî diyar e; dema ku Aryaniyan îman bi heyîn û yekitî û balatiya Ahura Mazda dianîn Erebên çîptazî li Meke û Medîneyê ji pût û seneman re xûz dibûn…
Tişta balkêş ew e, ku hê wê demê Yazgird mîna ku hay ji Sureta Ûsiv(5) hebe, di nameya xwe de weha dibêje:
‘Îroj ji me tê xwestin ku artêşa me were bindestkirin ji aliye artêşa ereb ve, bi navê "Allah-Û-Akbar". Bi zora şûr dê me bibin ser ola xwe ya "Allah-

U-Akbar" û wê me bêgav bikin ku em ji xwedayên wan re rojê pênc car bi erebî secde bikin, ji ber ku "Allah-Û-Akbar" tenê ji erebî fêm dike.(6)
Wisa bihizirin û bizanibin ku, heta ku Qur'an nazil nebûye, li Rojhelata Navîn, li Çila Ken'an, li bakûr û başûrê Mezra Botan yek qewm ne bêpirtûk e, ne bê rêber û pêximber e ji bilî Ereban!
Bi hatina Qur'anê re Erebên xwedî pût û senem dibin/bûn Xwediyên Xweda, û ji wê rojê de her kes/î vexwendin/vedixwînin – geh bi nameyan, geh bi şûr- ser 'rêya rast'!
Li gorî hişmendiya Ereban ya wê rojê û îro jî naskirina Xweda têrî baweriya bi Xweda nake; ji ber ku pêdiviye her qewm, her kes baweriya xwe bi Qur'anê, bi Resûl bîne, û bi dû re jî bi Xweda, yanî bi Allah- û Ekber! Xweda mezin e, ne Xwedayê ku Ereb weke Xwedayê Mezin dibînin bi tenê mezin e!
Lê belê sed heyf û sed mixabin, Kurdên ku ji Êzdayetiyê vegeriyan û misalmanetî qebûl kirin, nekarîn bawermendên li dû Ahûra Mazda yên ku rojê pênç wextan berê xwe didin rojê, diayên herî şîrîn, qenciya herî qenc, roniya herî bi ron hêvî dikirin/dikin; Ezîdîyan li ser axa wan bisitirînin li quntara Çiyayê Bagokê, li herêma Torê, li Gundê Dawûdiyê, li Bişêriyê, li Beedrê, li Şêxan, li Şengala axpîrox!
Li tevî kurdê nezan; roşenbîr, nivîskar, şêx, beg, axa…hemû kurdên misilman li tevî Serokê Kurdistanê rêzdar Mesûd Barzanî ku di gotina xwe de , 'Resentirîn Kurd Êzdî ne' rast û dirist bin, rojekê berî roja din pêdiviye ku em ûzr û bexşîna xwe ji Êzdiyan ku ev du hezar sal e digel hemû tundî, tûjî û dijwariyê zimane me , ayîna me ya kone, û çanda me ya qedîm parastine, bixwazin; û her weha ji Xweda/Ezda/Ahura Mazad jî!
Kurd hebin/mabin, ew jî kurdên Êzdî ne:
Hem bi zimanê xwe, hem bi ayîna xwe!

Pêşniyara mine w e, ku bi pêşengiya we pêngava kampanya ‘bexşînxestin û lêborîna ji Êzdiyên Kurd’ bêt avêtin.

Çavkanî:

1.Kovara War,Jmr.3,Vendidad,Ji İngilîzî, N.Torî

2,3,4,6. Malpera Amîdakurd, M.Can Şeker

5.Quran,Sureya Yûsiv,ji mala bi tirkî, A.A.

EuroKurd Human Rights – www.eurokurd.net

Ji Federasyona Êzidiyan Nivîskar Loqman Bariş:

Gotina “Êzdî Kurdên resen in” têr nake

Gabar Çiyan

- Hêja Loqman, em te ji rojnamevanî û nivîsên te û ji rêvebiriya dergush.com ê nas dikin. Ji kerema xwe re ji mere qala xwe bike. Loqman Bariş ki ye?

Loqman Bariş: Ez di sala 1975'an li navçeya Ruha Wêranşarê li gundê Zewra ji dayik bûme. Li wir min dibîstana seretayî xelas kir û du salan jî dibîstana navîn xwend. Di sala 1989'an de hatim Almanyayê û min xwendina xwe li vir dewam kir.

Di sala 1995 an de min li Med-TV dest bi kar kir. Paşê bi rêzê li C-TV, MEDYA-TV, ME-TV û ROJ-TV heta sala 2005 xebitîm. Di MEDYA-TV û ME-TV de min weke pêşkêşvan û redaktorê nûçeyan kar kir. Niha jî li zanîngeha Hannover beşa dîrok û felsefeyê dixwînim. Di ber xwendina xwe re malpera www.dergush.com bi rê ve dibim û di rêveberiya Federasyona Komeleyên Êzdiyan de cîhê xwe digrim.

- Federasyona Komeleyên Êzdiyan-FKÊ çi demê hate damezirandin û armanca wê çi ye?

Loqman Bariş: Federasyona Komeleyên Êzdiyan FKÊ rêxistina ban a mal û komeleyên Êzdiyan e. Di sala 2004'an de hat damezrandin û niha di bin banê de wê de 2 mal, bi dehan komel û komîte hene. Di demeke gelekî

kin de du malên din vedike. Bi hezaran endamên van mal û komeleyan hene. Lewma rêxistina herî mezin a Êzdiyên li Ewrûpayê.
Beriya FKÊ jî bi navê Yekîtiya Êzdiyên Kurdistanê bi qasî 12 salan xebatên xwe meşandibû. Rêveberiyekê wê ya ji 15 kesan heye û bi giştî di bin banê vê rêxistinê de bi qasî 140 kes dixebitin.
Federasyona Komeleyên Êzdiyan di xebatên xwe de nasnameya xwe ya kurd weke bingeh digre. Lewma ne tenê rêxistineke olî herweha rêxistineke netewî ye. Bi kurtasî armanca wê ewe ku ol, nasname û çanda Êzdiyan di qada netewî û navnetewî de bide nasandin, xweşbîniya di nava olan de zêde bike. Ji bo vê yekê ji aliyekî xebatên dîplomatîk dimeşîne, ji aliyê din ve jî tevî Civaka Îslamiya Kurdistan û Federasyona Elewiyên Demokratîk, Platforma Olên Mezopotamyayê damezrand.
Dîsa ji bo nasandina Êzdiyan gelek pirtûkên olî, dîrokî, edebî û çandî çap kiriye/dike. Li gelek deveran dersên olî, zimanê kurdî, folklor uhw. dide zarokan. Berê kovareke bi navê Laliş derdixist, lê niha xebata xwe ya di vî warî de bi riya malpera www.dergush.com dimeşîne.
FKÊ ji aliyekî van karan dike, ji aliyê din ve jî hewl pirsgirêkên nava Êzdiyan çi yên di nava xwe de, çi jî yên bi civakên din re çareser bike. Lewma xebata wê di nava gel de û bi gel re ye. Wekî din gelek panel û çalakiyên cûrbecûr organîze dike.
Federasyona Komeleyên Êzdiyan tevî van karan bi komeleyên êzdiyan ên li Ermenîstan, Rusya û Şengalê re jî di nava danûstandinên xurt de ye.
- Li ser pirsa parastina Êzdiyan dîtina te çi ye?
Loqman Bariş: Tevî ku hejmara Êzdiyan tenê derdora milyonekê ye jî, îro ji bilî bakur, başûr û rojavayê Kurdistanê, li gelek welatên Kafkasyayê, li Rusya heta Sîbiryayê jî belav bûne. Zêdetirî sedhezarî li welatên Ewrûpayê, bi taybet li Almanyayê dijîn.

Lewma dema mirov parastina Êzdiyan guftûgo bike, divê her welatî taybet binirxîne. Weke mînak; dema mirov bahsa Êzdiyan li başurê Kurdistanê bike, divê bahsa zexta olî, kuştin û qetlîaman bike. Lê dema bahsa Ewrûpa bike, divê bi taybet bahsa asîmîlasyonê bike. Li Kafkasyayê jî pirsa 'gelo Êzdî Kurd in an na' derdikeve pêşberî me.
Li bakurê Kurdistanê bi têkoşîna rizgariya gelê Kurd re, tahamûl û tolerans ji bo Êzdiyan zêde bûye. Zexta berî salên heştêyî gelekî kêm bûye. Eger hîn hînekî hebe jî bêhtir meseleyên êşîrî ne. Îsal dema du caran çûm welêt, min ev yek dît. Ango biratî derketiye pêş. Ji xwe eger mirov bahsa biratiya Kurd û Tirkan bike, bahsa biratiya Kurd û Ereban bike, bahsa biratiya Kurd û gelên din bike, li hemberî wê jî biratiya Kurdan xwe bi xwe derxîne pêş, wê demê ruhê netewî bi mirov re nîne.
Ji ber ku berî em û gelên din bigihîjin hev ango bibin birayê hev, herçiqas ola me ne yek be jî em Kurd xwe bi xwe birayên hev in. Hemû Kurd berî Muslumantiyê qebûl bikin, Êzdî bûn. Niha jî hin merivên Êzdiyan ên gelekî nêz û Îslam weke ol qebûl kirine, hene. Ola me ne yek be jî, zimanê me, çanda me, dîroka me, xwîna me, şahî û cejnên me, xewn û xeyalên me, êş û azarên me yek in.
Mixabin em dîbinin ku li başûrê Kurdistanê ev rastî li ber çavan nayên girtin. Salek berê havînî ji bo hin dokûmenteran li ser Êzdiyan çêbikim, li başûrê Kurdistanê bûm. Bi tevahî sê mehan li başûr û di nava Êzdiyan de mam. Dema ez li Hewlerê bûm, fermana li Şengalê pêk hat. Paşê derbasî wê herêmê jî bûm.

Beriya her tiştî nêrîna li Êzdiyan gelekî neyênî ye. Êzdî weke kafir, weke kesên bêol, weke xwedênenas, weke neyar tên dîtin. Helbet ne herkes weha dibîne, lê piranî. Lewma jî tevî ku bi sedhezaran Êzdî li wir hene jî êdî çavên herkesî li revê ye. Herkes dixwaze canê xwe rizgar bike.

Nizanim valakirina welêt li gor berjewendiyên kê ye? Nizanim eger Şengal bi Kurdistanê ve neyê girêdan kî wê qezenc bike?

Bi taybet ewlekariya Êzdiyên li Şengalê nîne. Ew dever hatiye jîbirkirin. Tirsa ji mirinê li aliyekî, birçîbûn û tîbûn niha derdê herî mezin e. Kar jî nîne. Ji xwe erzaqê Neteweyên Yekbûyi belav dike, nagihîje wan. Destê herkesî vekirî û hêviya wan Xwedê ye. Dibe ku ew dever di fermiyetê ne girêdayî hukûmeta Kurdistanê be, lê di warê pratîkê de her tişt di dest partiyên Kurd de ye.

Ji bo parastina Êzdiyan, li gorî min divê pêşî em vê pirsê ji xwe bikin, gelo em dixwazin Êzdî werin parastin? Ev pirs ji rayedarên hukûmeta Kurdistanê ye. Dema ku meleyek li bajarekî weke Duhokê waazê bide û Êzdiyan weke neyarê Xwedê bide nasandin û lewma jî qetlîama wan helal bike, wê demê Êzdî dê neyên qirkirin? Dema rayedarên hukûmetê jî vî meleyî ji wezîfeyê negrin û ceza nekin, mirovê çewa bahsa parastina Êzdiyan bike? Lewma li gorî min bersiva vê pirsê gelekî girîng e.

Bersiva pirsê erênî be, gavên bên avêtin gelekî hêsan in. Xurtkirina asayîşê bi serê xwe ne çare ye. Beriya her tiştî divê nêrîna me ya li ser Êzdiyan were guhertin. Gotina ‘Êzdî Kurdên resen in’ têr nake. Divê hukûmeta Kurdistanê siyaseteke taybet û pozîtîf ji bo Êzdiyan destnîşan bike. Di vê siyasetê de divê xweşbîniya li hemberî Êzdiyan derxîne pêş. Di dersên dibîstan û zanîngehan de, li mizgeftan, di çapemeniyê de divê bahsa niqteyên hevbeş û biratiyê bê kirin û ne ku Êzdî weke xwedênenas werin nasandin. Ji ber ku ev ne rast e jî.

Piştî ku ev siyaset hat qebûlkirin, gavên din ên werin avêtin li pê tên. Bi vê yekê re gel wê hevûdin qebûl bikin û jiyana Êzdiyan wê were parastin. Wê demê êdî mirov dikare bahsa parastina Êzdiyan ji aliyê çand, ziman û olê ve dike. Mixabin em hîn ji vê yekê dûr in.

EuroKurd Human Rights – www.eurokurd.net

Seroka Federasyona Komeleyên Kurdîstanê Li Swêdê Şermîn Bozarslan:
Çanda Ezidî Çanda Kurdan ya herî kevnare ye
Gabar Çiyan

- Hêja Şermîn, em te ji xebatên Federasyonê yê piralî û rengîn nas dikin. Em dixwazin dîtina te li ser parastin û ewlekarîya Êzidiyan bistînin...

Şermîn Bozarslan: Kurdên Ezidî ji ber ku him kurd in û him jî Ezidî ne; gelek teda dîtin e. Bi taybetî ewana di herêmên ku bi fermî ne li ser Kurdistanê ve hatine girêdan de dijîn, gelek zilm û zordarî dîtin e û dibînin. Meriv li ku bibe bila bibe, divê meriv ji ber nasnameya xwe ya netewî an jî olîtîyê neyê pelçiqandin û kuştin.

Di herêmen ku grûbên îslamî yên extremist lê hene ewlekariya Ezidîyan her tim di xeterê de ye. Ewlekarîya wan him wek kurd û him jî wek Ezidî yekcar di bin riskekî mezin de ye. Parastina kurdên Ezidî, li heremên ku niha bi fermî ne ser bi Kurdîstanê ne di destê yekem de vatinîya Hukûmeta Iraqê ye.

Hindikbûn zehmet e. Piranî gelek caran li gor normên xwe rewşa Êzîdiyan nirxandine. Di xwe de heq dîtin e ku li ser navê wan xeber bidin û wan tarîf bikin. Meriv divê ji êzîdiyan bixwe bipirse ew li xwe çawa dinêrin? Çi dijîn? Çi dixwazin? Ji hukûmeta Iraqê çi dixwazin? Ji me kurdan çi dixwazin?

Çanda Ezidî, çanda kurdan ya herî kevnare ye. Ew li ser axa xwe, çanda xwe ya kurdîtîyê û Ezidîtîyê bi salan parastine û anîne hetanî dema me. Jiyandina çanda Ezidîtîyê , jîyandina beşeke bïngehîn ya çanda kurdî bixwe ye. Ez hêvîdar im di demekî kin de herêmên Kurd ku tê de gelek Ezidî dijîn; bi hêrema Kurdîstanê ve bên girêdan. Wê demê dê parastina ewlekarîya wan hêsantir be!

Destê dijminên kurdan di gelek bûyeran de ku li dijî kurdên Ezidî hatine kirin, hene. Armanc, provokasyon e. Armanc ew e ku kurd bilîyê hev du bibin, tifaqên xwe xira bikin û destkeftîyên xwe ji dest derbixin.

- Li ser pirsa Parastina Kurdên Ezidî li Herêma Kurdistanê dîtina te çi ye?

Şermîn Bozarslan: Di nav herêma Kurdistanê de rewşa Kurdên Ezidî baştir e. Serok, serokwezîr û parlamentoya Kurdîstanê wan bi fermî diparêzin. Temsîla wan di parlamentoyê de heye. Rêxistinên êzîdiyan hene. Wek kurdên Ezidî dikarin doza mafên xwe bikin.

Di jîyana rojane de carna bûyerên nexweş li hemberî êzîdiyan çêdibin. Ji ber ku pêşîya van bûyeran bên girtin; divê meriv xebatên dûr û dirêj yê sistematîk, xebatên perwerdeyî li ser bingeha civateke pirkulturî, pirolî û pirzimanî û li ser mafê mirovahîyê di dibîstan û medyayê de bête kirin. Mamoste, siyasetmedar, karmend, xwendevan, cîran, her kes dîvê bo parastina Kurdên Ezidî xwe berpirsiyar bibîne.

Di dibistanan de divê ya agahdarî li ser her olî bê dayîn yan jî li ser tu olî tu agahdarî neyê dayin. Divê siyaset û ol cuda bên girtin. Divê civat yên ku islam wek siyaset bikartînîn, yên ku islam li gor menfeat û li gor mêjiyên xwe yên kevneperest şirove dikin, îtîbar neke, ji wan re deng nede. Lewra xwendin û perwerdekirina civatê gelek girîng e.

Di dawîyê de dixwazim bibêjim ku di civata demokratîk ya kurdan de divê qîmeta Kurdên misilman, Kurdên Ezidî , Kurdên bêbawer wekhev be. Zarokên me jî divê li gor vê yekê bên perwerdekirin.

EuroKurd Human Rights – www.eurokurd.net

Rêvebirê Enstîtuya Kurdî ya Stockholmê Serkan Brûsk:

Heta ku Êzidîtî hebe dê zimanê Kurdî hebe

Gabar Çiyan

- Ji kerema xwe re xwe bide nasîn.

Serkan Birûsk: Sala 1967 li herêma Omeriyan, li gundê Çalê hatiye dunyayê. Wî li Nisêbînê dest bi dibistanê kir û li bajarê Îzmîrê beşa mîmariya peyzajî ya unîversîteyê xwend lê ji ber sedemên siyasî wî dibistana xwe di nîvê de bi cî hişt û ew derket Ewrûpayê. Li Ewrûpayê wî karê nivîsandinê û rojnamevaniyê kir.

Gelek dokumenter û film hem wergerandin û hem jî dengê xwe daye wan. Herwisa wî amadekarî û pêşkêşvaniya programên wêje û çandî yên mîna Raman û Roman, Nav û Deng kiriye ku ev program di Tv Mezopotanya û Medyê de hatine weşandin.

Niha ew di birêvebiriya Înstutiya Kurdî ya Stockholmê de ye û li Înstutiya Teknolojîyê beşa teknîsyeniya avahî û mûlkî de dixwîne.

Berhemên wî yên wêjeyî ev in.

Helbest: Awurên bi hêvî, Xem vedixwim bi tasa sor ji demê, Peyvên Êşmij

Werger: Mûa û Pelle, Madîken, Ciwanên Îro, Xîzgur…

Roman û ceribandin: Sê Terîş, Mextel

- Bi taybetî li Şengalê û li deverên din yê Kurdistanê Êzidî dibin qurbana êrîşên hovane. Ewlekariya wan li ser xaka xwe tune ye. Weke şexis û rêvebirêk ji yê dezgehek netewî , ji bo parastina Êzîdiyan li tevayê herêmên Kurdan dîtina we çi ye, divê mirov çi bike? Em çawa dikarin vê çanda kevnare xurtir bikin?

Serkan Birûsk: Dema mirov ji awira ewlekariyê de rewşa Kurdên Êzidî bigire dest û binirxîne, du faktorên esasî derdikevin pêşberî me.

Yek jê faktora hêzên derve ye. Çi dewletên dagirker û çi jî dînên biyanî bin heman tesîrê li ser rewşa Êzîdiyan dikin ku ew jî bi giştî xerabkar û talankar e. Mirov bi rehetî dikare ispat bike ku faktora derveyî, seranserî dîrokê û heta roja îro jî bûye çavkaniya hemû cure dujminahiyên li dijî Kurdên Êzidî.

Miletên ku gelê Kurd ji xwe re kirine dujmin di serî de berê xwe dena hemû hêjahiyên ku nasnameya Kurd pêk tînin. Ziman, çand, ol, adet û sembolên ku Kurdayetiyê nûner dikin wek hedef hatine girtin. Mirov piraniya van faktorên êrîşkirî di kesayetiya Êzîdiyan de dibîne. Êzidîtî bi ziman, kinc, rabûn û rûniştin, îbadet û cejnên xwe qutiya reş a Kurdiyatiyê ne. Vekirina vê qutiyê bi awayekî qebe û zordarî ya bi destê dagirkeran zirarê dide van hêjiyayên ku me li jor rêzkirine.

Dagirkerên Kurdîstanê Êzîdiyan bi awayekî sîstematîk û fikirkirî ji axa wan sorgon kirin û hê jî dikin. Ew bi vê yekê dixwazin rehê dara Kurdayetiyê hişk bikin (ez dizanim ku ev îdayek mezin e û heta hinekî ji rastiyê dû re, ji ber ku hejmara Kurdên neÊzidî yên ji her cure dîn, çîn, bawermend û nebawermend prosenteke pir mezin e, îca dema mirov êzîdiyên ku xwe Kurd nahesibînin jî lê zêde bike wêdemê dê baştir bête fêmkirin) Lê ez dîsa jî vê gotina xwe dubare dikin, ji ber ku ji bo min êzdahî ji olekê zêdetir (tevî hemû rêz û hurmeta min ji vê olê re) bûye sembola Kurdayetiyê.

Ma ji bilî Êzidîtiyê çend olên din îbadet û duayên xwe bi zimanê Kurdî dikin?

Ji ber vê jî heta ku Êzidîtî hebe dê zimanê Kurdî hebe, berevaciya vê jî divê rast be, heta Kurdîtî hebe wê Êzidîtî jî hebe.

Ez wek wêjevan û Kurdperwerek ku rola zimên di azadkirina Kurdayetiyê de pir bilind û nirxdar dibînim, vê rola sembolîk a Ezîdiyê jî di çarçoveya Kurdayetiyê de pir jiyanî dibînim. Ji loma jî divê Êzidîtî, yanî Kurdayetî di bin her merc û şertan de li welat, li derveyî welat û li hemberî Kurdên paşverû (yên misilman, Êzidî û hwd) û hevkarên wan ên biyanî bêparastin.

Li vir em divê faktora paşverû ya hundirîn a Kurdên Êzidî jî li ber çavan bigirin. Ji bo ku ev ol karibe di şert û mercên îro de bijî, bersivê bide vê

serdemê û ciwanên xwe, divê alimên Êzidî roleke çawa bileyizin? Ez vê wek pirsekê li vir dihêlim.

Ez vegerim ser faktora duyemîn. Di serî de dînê îslamê û hemû dînên din xwestine di nava Kurdan de cî bigirin û Kurdan ji baweriyên wan dûrbixin. Piraniya caran jî, wek mînaka misilmantiyê, ev piroses pir xwînavî derbas bûye. Kurdan her li berxwe daye lê hêzên biyanî baweriyên xwe bi darê zorê li ser Kurdan ferz kirine. Pişt re avahiyên xwe li Kurdistanê ava kirine. Ji nava Kurdan hevkarên xwe li ser bingeha dujminatiya nirxên Kurdayetî perwerde kirine. Bêguman gelek Kurdên oldar li dijî vê derketine û xwestine rengê xwe yê Kurdayetî biparêzin, lê zêde dengê wan derneketiye. Yên ku dengê wan derketiye jî nekarîne yekîtiyekê ava bikin, ew bi navê mezheb, ol û eşîrtî ji hevdu hatine xistin. Wek encama vê hevnegirtin û jihevbelavbûnê gelek serok û rêberên Kurdan li ber sêdaran gotina xwe ya dawî gotine.

Îro jî rewşa me ji vê nedûr e. Li bakurê Kurdistanê dîndarî zêde dibe. Ez bi xwe tevî hemû kêmaniyan jî jê re dibêjim Kurdistana Azad û nirxeke bêhempa didim vê avahiyê jî, divê ez bêjim ku, Başûrê Kurdistanê ber bi dewleteke meletî ve diçe. Heger di camiyek tenê ya Kurdistana azad de jî, li dijî Êzidîtiyê bi devê misilmanên xwînvexwarê Kurdan bê axaftin û tu rayedar pêşiya vê xwefiroşiyê negirin, ew ê sibe erebên beriyê van maşikên xwe di nava parlementoya Kurdan de li dijî Kurdayetiyê bidin axaftin.

Li vir bila şaş neyê fêm kirin, ez ne li dijî tu ola me, heta ku di navbera kes û Xwedê de be, mafê herkesî heye îbadeta xwe bike û divê ev derfet ji aliyê desthilatdariyê ve ji bo herkesî bê dayin.

Min hewil da ku di çerçoveya ewlekariyê de bersiva te bidim. Bêguman ji ber ku îro xetereke pir mezin li dijî Êzidîtiyê heye, em divê singa xwe bidin ber her cure êrîşan û daxwazê ji birayên xwe yên Êzidî bikin ku ew yekîtiya

xwe xurttir bikin, tevli hemû cure hewldanên pêşverû yên Kurdan bibin, wek civak xwe li ser esasê zanistî rêkxistin bikin, kadroyên Kurdperwer û zana perwerde bikin.

Çawa ku kesên mîna Kanadê Kurdo, Erebê Şemo, Heciyê Cindî, Şakirê Xudo û hwd bi berhemên xwe yên wêjeyî xizmeta ziman û çanda Kurdî kirine, divê ji niha û pê de ciwanên êzîdiyan ala van navdaran di her warê Kurdayetiyê de bilind bikin.

Em divê ji bira nekin ku qedera me hemû Kurdên azadîxwaz û pêşverû yek e.

EuroKurd Human Rights – www.euroKurd.net

Serokê Komela Çandî ya Êzidiya li Mûsilê Prof. Dr. Ali Seedo:

Mafên reng û olên cewaz li Iraqê di xeterê de ne

Gabar Çiyan

- Ji kerema xwe re, xwe bide nasîn, Mamoste Ali Seedo ki ye?

Prof. Dr. Ali Seedo Rasho: Min, di sala 1979 an de zaningeha Musilê beşa erdzanînê xwend. Di heman zaningehê de, li ser çandinî û karanîna erdê mastera xwe bi dawî anî. Niha ji bo du salan li zanîngeha Emerîka li Kahireyê mamostetiyê dikim.

Gelek lêkolînên min belav bûne. Beşên giring ev in: Êzidî û Ezidîzm (2006 erebî), Rewşa Êzdiyan li Iraqa îro (2006, erebî), Dengê Êzidiyan di hilbijartina 2005 an di lîsteya Kurdan de û encam (ji Kofî Annan re hate şandin), Analîzek ku êrîşa li dijî Şêxan û deverên din yê Êzidyan pêk hatin. Kûştina keça Êzidî Duhayê. Biryar û kirinên Kurdên misilman yên paşveru li dijî Êzidiyan (erebî 2007).

Di gelek konferansên li ser pirsên etnîkî li Iraqê beşdarî kiriye. Mîsal: Rêvebir di Konferansa Pirsa eqaliyetan li Iraqê 1 ê û 2 ê (Musil 2004, Baxda 2006). Projeya perwerdê li ser çareserkirina pirsgirêkan û rawestdina bazara penaberkirinê (2004, Baxda), pêşdebirina pirsa mafê

mirovan li Iraqê (2004 Urdin), pirsa kriminalizekirinê û di civatê de wekhevî (2008, London) û hwd...

- Ji kerema xwe re li ser Komela Çandî ya Êzidiyan li Musilê, anku li ser Yezidi Cultural Association -YCA zaniyariyê bide me…

Prof. Dr. Ali Seedo Rasho: Mirov dizane ku ji ber helwêsta rejîma Sadam li Iraqê, li dijî Êzidiyan gelek çîrok, serpêhatî û zaniyariyên bêbingeh hatin belavkirin. Ev tev bûn sedem ku, rêvebirên dewletê li herêma Êzidiyan rê li ber xizmetên gişтî, weke perwerde, bijijkî, elektrîkê bigrin. Ev zilma bi sed salan û nenaskirina niwênertiya Êzidiyan di daîreyên fermî de bûn sedem ku hejartiyek mezin li herêma wan pêk were û hejmara kesên neperwerde bûyî bilind bibe.

Piştî têkçûna Sadam, di Iraqa nû de, ji bo naskirin û bidestxistina mafê Êzidiyan komela me hate avakirin. Endamên me bêhtir ji kesên xwende, ji ronakbîran pêk tê. Di nav me de profesor, parêzger û mamosteyên zaningehan hene. Bêhtir kesên sekuler in.

Yek ji armanca me ew e ku, di Iraq nû de, li ser pirsgirêkên mafê jinan, zarokan û jibo çareseriya dijberiyên hene xebatê bikin.

Her wisa, avakirina civatek demokratîk, belavkirina zaniyariyê li ser çanda Êzidiyan, pêşxistina helwêstên pejirandina hev li Iraqê, di nava daxwazî û xebatên me de cî digirin. Di nava armancên me de, avakirina pirtûkxaneyekî û derxistina rojnameyekî jî heye.

- Qanûna nû ya Iraqê, benda 50 î hate rakirin. Paşê li dijî helwesta hikumeta Iraqê gelek çalakî pêk hatin. Êzidiyan jî dengê xwe bilind kirin. Ji kerema xwe re li ser pirsê dîtina xwe bîne zimên…

Profesor Dr. Ali Seedo Rasho: Divê ez eşkere bînime zimên ku, piştî hilweşandina benda 50 î ji qanûna herêmî li Iraqê, mafê eqaliyet û olên cewaz ketiye bin xeterê, bin tehdîtê.

Di 22 ê tîrmeha 2008 an parlamentoya Iraqê qanûna hilbijartina herêman pejirand. Benda 50 î mafê temsîla niwênerî dida van rengên cewaz. Hejmara Yezidiyan 600 hezar in, lê li gorî qanûnê 1 niwênerê wan hebû. Qanûn xwedî kêmasî bû. Lê ji ber ku hebûna van rengan dipejirand û li ber çavan digirt, bi dilxweşî bixêrhatina wê kirin. Qanûn piştî hefteyekî din ji aliyê şewirmendiya serokatiyê ve hate redkirin û paş de şandin parlementoyê. Piştî du mehan ku guftugo pêk hatin, qanûn ji nû ve xistin dengdanê. Di 24 ê îlonê, di nav koma Kurd û Şuiyan de lihevhatin çêbû û qanûn nehate pejirandin.

Rakirina qanûnê îşareta herî mezin e li Iraqê ku, mafên qanûnî yê eqaliyet û olên cewaz tê binpêkirin, nenaskirin.

Bi rakirina benda 50 î, rêya qanûnî li ber temsîla eqaliyetan di parlementoya Iraqê de hate girtin. Bi vê biryarê, kanala tevlîbûna eqaliyetan jibo xebatên pêşeroja Iraqê hate xitimandin. Ev kêmasiya hiquqî dê rê ji bo tirsandin û tehdîtkirina eqaliyetan veke, dê rê jibo koçberiya wan ji xaka bav û kalên wan veke. Biryar eşkere dike ku, di parlamentoya Iraqê de hejmarek kes hene. Ew dixwazin Iraqê vala bikin, eqaliyetan ji welatên wan dur bixînin û xaka wan dagîr bikin.

Ji nuha ve hejmara tehdîtan li hemberî eqaliyetan, û olên cewaz zêde bûne. Li Musilê, di 24 nîsana 2007 an de hejmarek Êzidiyên xebatkar yê têkstîlê hatin qetilkirin. Li gundên Al Qahtania û Al Jezideré di 14 tebaxê de hejmarek bilind ji kesên Êzîdî hatin kûştin û ewqas kes jî birîndar bûn. Piştî buyerê xwendevanên olcewaz ji zanîngeha xwe kişandin male, û du salên dawî, xwendina piştî lîseyê bo zanîngehê pir kêm dibe, nabe. Buyerên revandin û kûştin li dijî oldarên Mesîhî pêk hatin. Dêr bi erdê re kirin yek.

Piştî van buyeran hejmarek pirs li benda bersivê ne:

Kî berpirsiyarê van pirsgirêkan e? Kî dikare çareser bike û çawa dikare çaraser bike?

Me, weke parêzvanên mafê mirovan gelek caran dezgehên însanî yên navnetewî li ser pirsa şêweyê nenasîn û dîskîrîmînasyonên cewaz û xeterên dikarin bibin şiyar û agehdar kiribû. Em banga xwe dighêjînin wan dezgehan ku, ji hikumeta Iraqê pejirandina mafê eqaliyetan bixwazin, zext û bandore xwe li ser hikumetê zêde bikin. Piştî nepejirandina benda 50 î mafê eqaliyetan ji hole rabûye. Di rewşa îro de, çi navgîn tune ku eqaliyet dîtin û nerazîbûna xwe li Iraqê bînine zimên. Rê li ber wan hatiye girtin.

Li gorî rewşa îro, daxwaziyên me ev in:

Pejirandina niwênerên me di dezgehên herêmî û hikumeta federal de. Hejmarek bilind ji eqaliyat û baweriyên cewaz li Iraqê bê maf man, beşek mecbûr bû ku derkeve derveyî welêt. Pêwîst e rewşa wan hevwelatiyan li ber çavan bê girtin, ji hatina welêt pay bigirin. Herêmek nîvotonom di bin parastina civak /hêzên navnetewî de…

Eqaliyet û baweriyên cewaz di Iraqa îro ya nû de di bin tehdîtê de ne. Rakirina benda 50 î nîşan û delîla herî mezin e ku, li Iraqê mafê eqaliyetan ji aliyê qanûnî ve di xeterê de ye, kêmasiya wê heye.

Weke kesek ji parêzvanê mafê mirovan, daxwaziya min ji dezgehên însanî yên navnetewî ew e ku, çareseriyekê jibo vê rewşa cidî peyde bikin. Pêwîst e ji van rengên cewaz li Iraqê re ku bi hezaran sal li Iraqê jiyana xwe domandine, xwediyê cî ne û di avakirina welatî de rola wan çêbûye, gav bêne avêtin…

EuroKurd Human Rights – www.eurokurd.net

Ji Komîteya Rêvebir ya Komkarê Salihê Omerî:

Kurdistan bê Êzîdî nabe…

Gabar Çiyan

- Bi taybetî li Şengalê û li deverên din yê Kurdistanê Êzîdî dibin qurbana êrîşên hovane.

Weke dezgehek netewî , ji bo parastina Êzîdiyan li tevayê herêmên Kurdan dîtina we çi ye, divê mirov çi bike? Em çawa dikarin vê çanda kevnare xurtir bikin?

Salihê Omerî: Ezê nivîsa xwe, bi gotina Serokê herêma Kurdistanê hêja kek Mesûd Barzanî ve dest pê bikim. Mesûd Barzanî weha fermo dike "yan resentirên Kurd Êzîdîne, yan jî mileteke nîne bi navê Kurd" Ez jî dibêjim, gotina hêja kekê Mesûd Barzanî raste û esl û feslê Kurdan jî Êzîdî bixwe nin.

Bi ruxandina desthiledarîya Seddamê diktator li herêmên ku birayên me Êzdî li hebûn hîn baştir bû. Li Kurdistana başûr nêzî pênsed hezar birayên me Êzdî hene, cîhê ku lê bi cîh û warin zêde bajarê Şêxan, Şingal û Başîkê ne. Du endamên parlamentoya Iraqê, di nav Lîsteya Hevpeymaniya Kurdistanê û Lîsteya Tevgera Reformê û Pêşketinê de ne û herweha 3 endamên wan jî di parlamentoya Kurdistanê de ne, digel wezîrekê Herêma Kurdistan di kabîneya 5 a hikûmeta Herêma Kurdistanê dene, ji hêla hemû me Kurda û birayên meyî Êzdîyan cîhê pîroz bahîyê ye.

Di bîr û raya mide birayên meyî Kurdên Êzdî li ku dibin bila bibin, divê em bi her hawayî xwedî li wan derkevin û wan weke rûnîya çevên xwe biparêzin. Ji ber ku bi sedê salan û hezarên salan bi virde ola xweyî rasteqîn û welatparêzîya xwe weke Kurd parastine. Dîvê ku li perçê azad yê başûrê Kurdistanê bê şert û bê qeyîd parastina wan bêye kirin. Parastina birayên me Êzdî erka me Kurdan hemûyane.

Divê ku em Kurd bizanibin van birayên meyî Êzdîyên ku li ser esl û feslê xwe manin, di warê olî, kulturî, adetên bav û kalan û li ser koka xwe yê weke Kurd manin, wana bi parêzin û îmkanên madî û manewî ji wanre bixuliqînin. Ev jî zêde li desthiledarîya başûrê Kurdistanê dikeve,

bêguman di warê manewîyê de jî li her Kurdekî dikeve ku pîberî wan bibin, ev jî ereke netewî ku ji me hemû Kurdan têye xwestin. Berî îslamyetê, di nava gelê Kurde, ola herî kevin Zerdûştî û ola Êzdîya ye.
Divê birayên meyî Êzdî hebin û weke sembola Kurdan bijîn. Hebûna wan hebûna meye, tunebûna wan nemana me Kurdan e. Raste, Êzdî temsîla çand û kultura meyî kevner dike. Bi rastî jî yê çand û kultura meyî kevanere li ser linga hiştîye bi hezarê salan birayên meyî Êzdî bixwenin. Heta di xwendina dua û te-eta ji bo xwedê bi zmanê Kurdî di axifîn, li cimeatên xwe de, di şîn û şahîyên xwede, di derz dayînê xweyê olî û dibîstanên xwe de, bi zmanê Kurdî parwede dibin. Divê ev emenet û sembola ji bav û kalan maye bêye parastin. Divê hikumeta herêma Kurdistanê butçayeke ji bo hemû Êzdîyên ku hene veqetîne, ji bo vê çanda kevnar ya bav û kalên me Êzdîyan mane li ser linga bi mînin. Dîsa jî heger Kurdê bi esil û fesil mamin û li rîya xwe şaş nekirine Êzdîyetî bixwe.
EuroKurd Human Rights – www.eurokurd.net
Gerînendeyê Zarathustra News ê Rojnamevan Gabar Çiyan:
Divê Êzidî di îdareya devera xwe de desthilatdar bin

Loqman Bariş
- Hûn dikarin xwe bi xwendevanên me bidin naskirin?

Gabar Çiyan: Malbata min, ji Midyadê hatine û li Nisêbînê bi cî bûne. Ez li Nisêbînê hatim dinyê. Lê em bi eslê xwe ji Darê ne. Min, piştî lîseyê û perwerda navxweyî ya rojnamevaniyê, di rojname û kovaran de dest bi rojnamegeriyê kir. Rojnameya lokal ya Nisêbîne birêve bir. Ji ber lêkolînek xwe, û tehdîtên li ser min, ez mecbûr mam ku derkevim derveyî welêt. 1988 an û vir de li Swêdê dijîm. Hejmarek pirtûkên min çap bûne.

Ez gerînendeyê giştî yê ajansa Zarathustra News ê me. Her wisa EuroKurd Human Rights ê jî rêve dibim...

- Armanca we ji amadekirina dosya taybetî ya li ser rewşa Êzidiyan çi bû?

Gabar Çiyan: Çend sedemên wê hene:

Kurdistan welatek pirçandî û pirolî ye. Li wir hejmarek çand û olên cewaz hene. Weke Êzidî, Sûryanî, Cuhû û Ermenî. Ez bi wan rengan re mezin bûme. Piralî bandora xwe li min kirine. Dostaniya ji bav û kalan hatiye, îro li derveyî welêt jî bi zarok û torinên wan re didome. Ez piştgirê parastina wê mozaîka pir rengîn im. Ezîdî xwediyê esîl yê Kurdistanê ne. Kurdiya esîl, Kurdbûyîna kur bi saya wan li ser nigan maye.

Em mecbûr in li hebûna xwe xwedî derkevin...

Rengên li Kurdistanê, exlaq û normên tîcarî jî ava kiribû. Nirxê hunerê, ked û xwedanê bi hebûna wan bilind dibû. Îro beşek ji wan rengên cewaz ji ber sedemên cuda ji welêt barkirine, ji cihên xwe hatine dûrxistin. Wan valahiyek mezin di du xwe de hişt. Beşek ji xelkê me îro, ji fêrbûna huner û kar, û ji qezenca bi keda xwe bêhtir bi du dewlemdbûna bêked ketine. Ji bo qezenca bêkêd, Kurdan jî mîna tirk û ereban dest bi karên xirab kirine…

Divê xebat ji bo vegera wan bê kirin. Da ku welatê me li xwe vegere.

Ez hinekî vê yekê dikim.

Înkara hebûna rengên wisa, neparastina wan û bêhelwestmayîn rê ji qirkirin û koçberiyên nû re vedike. Divê pirsa mafê eqaliyet û olan, ji aliyê me ve weke pirsên pir giring û pîroz bêne dîtin.

Ji bo belavkirina vê baweriyê ez dixebitim.

Ez ji bavûdê, ji kurdên misilman im. Lê Ezîdîtî di dilê min de ye. Di ruhê min de ye. Hezkirina min ji bo bawermendên Mesîh û Mûsa jî mezin e. Ez hinekî Mihemedî, hinekî Mesîhî û hinekî jî Mûsayî me. Lê di dil û rûhê xwe de, Ezidî me.

Ez hewil didim ku weke kesek Ezidî hizir bikim. Êşa canê wan ya min be. Lewma li cem min, parastina Ezidîtiyê û berjewendiyên wan, li ser berjewendiyên îdolojîk in. Ew nirxên herî bilind yên netewî ne. Ez dixwazim xizmetê jê re bikim.

Demek dirêj xebata min bi Suryaniyan re bû. Ez, di avakirina Enstîtuya wan ya pêşî " Mezopotamya" de, endamê avakir bûm. 4 pirtûkên min li ser wan hatine nivîsîn. Hejmarek mezin ji ronakbîrên wan nas dikim. Têkiliyên me yên biratiyê ne.

Cuhu jî wisa. Min ji bo avakirina pirên biratiyê bi Kurdên Cuhu /Cuhuwên Kurdistanê re çend gav avêt. Pir kêfxweş bûn. Niha jî ji bo Ezidiyan hinek hewildanên min çêdibin.

Parastina reng û olên li Kurdistanê, hebûna wan garantiya toleransê ye. Hevdu fêmkirin, tehemula çand û olên cewaz bi saya wan dikare bibe.

Ez bi vê zanînê nêzî pirsê bûm.

Îro, hikumeta Iraqê û Herêma Kurdistanê ji aliyê Kurdan ve tê rêvebirin. Anku hêza wan heye ku bandorê li gelek biryaran bikin.

Di sala dawî de, li ber çavê cîhanê û Kurdan, Êzidî hatine kûştin û qetilkirin. Neteweyên nexêrxwaz, planên jenosîdê li dijî wan gav bi gav pêk dihênin. Lê ji bo parastina wan, mafê wan yên olî û însanî, gavên cidî nayêne avêtin.

Me xwest pirsê bînine rojevê. Bibin ber destê dezgehên netewî û navnetewî.

Xebata me berdewam e.

- We encameke çawa ji hevpeyvînan derxist? Êzidî wê çawa werin parastin?

Gabar Çiyan: Parastina Ezidiyan, gava dil bixwaze, helwest û programek kurdan bi xwe hebe û bi israr bê raçavkirin û pêkanîn, wext digire, lê dikare bibe.

Dezgehên demokratîk, hêzên polîtîk yên Kurdan bi giştî dilxwazê gavek wisa ne. Lê hineka ji wan re nebûye pirsgirêkek ji ya esasî. Di programên wan de bi nivîskî heye, lê ji ber sedemên cewaz xala li ser pirsê aktîf nabe. Wezîfeya herî mezin dikeve ser milê ronakbîrên Ezidiyan, ronakbîrên Kurd ku di ruhên xwe de Êzidî ne û dilxwazê wan. Divê programek wan hebe. Pirs ji sê aliyan bê nirxandin:

1- Ji bo ku gund û bajarên Ezidiyan ji awira ewlekariyê ve bi giştî têkeve bin kontrolê û tedbîr bêne girtin, divê gava bingehîn bê avêtin û ji bo vê jî xebat bê rawestan bê kirin: Divê devera Êzidiyan bi giştî bi Herêma Kurdistanê ve bê girêdan...

2- Di qonaxên dîrokê yê cewaz de heta îro, ji ber êrîş û nêzîkbûnê neînsanî yên ereb, romî, ecem û beşek ji kurdên misilman, rewşa Êzidiyan ji awira aborî, çandî, bijijkî, perwerde, lixwevegera ola wan ve, gavên pêwîst nehatine avêtin. Kêmasî hene. Ji wan re alîkarî pêwîst e. Ji bo pêşketina devera wan, pêwîstî bi aramiyê û azadiyek nisbî heye.

Mirov dibîne ku, li herêmên cînar, kurdên misilman ji destê wan xwarinê naxwin, fituyên mirinê derdixînin. Ji bo rê li ber tevayê êrîşan bê girtin û rewşa wan baş bibe çend gavên pratîk û qanûn pêwîst in:

A) Weke ku birêz Serok Mesûd Barzanî jî qal dike, divê Êzidî Kurdên esîl bêne dîtin. Tevayên êrîş û biçûkxistina li dijî wan bê ceze nemîne. Divê ev bend bibe qanûnek bingehîn û ji aliyê Hikumeta Herêmê ve bê pejirandin.

B) Di cîhanê de gavavêtinên însanî pir in. Weke mîsal, dema ku nijada kûlîlkekê dikeve xetera wundabûn û tunebûnê, qanûnek tê derxistin. Raya giştî li ser xetera li pêşiya kûlîlkê tê agehdarkirin. Mirov tenê xweşikbûna kûlîlkan temaşe dike, bêhn dike. Lê wan jê nake. Bi qanûnên wisa, kûlîlk têne parastin. Nimuneyên wisa ji bo beşek teyr, bajarên kevanare jî tên girtin. Ew teyr û bajar dikevin bi parastina dezgehên netewî, anjî navnetewî.

Yezîdî jî mîna kulîlkan in. Îro jiyana wan, di bin tehdîta ereban, grubên ekstrêm û kurdên misilman yên paşverû de ye. Pêwîstiya Êzidiyan bi aramî û azadiyek nisbî heye. Em zanin ku li Herêma Kurdistanê xebat û kar piralî dibe û têra xwe mijul in. Divê mafê Êzidiyan ji aliyê Hikumeta Herêmê ve bê parastin, lê Êzidî bi xwe ji wan re nebin bar. Ew jî tevlî xebata qonaxa pêşketina herêmê bibin.

Weke ku li jor jî hate qalkirin, Kurdên misilman nikarin rêvebiriya cihên Êzidiyan, bêteref bikin. Lewma divê Êzidî di bajar û gundên xwe de desthilatdar bin: Şaredarên bajarên xwe bin, polêsên devera xwe bin, doktor û mamosteyê xwe Êzidî bin û rêvebirên devera wan Êzidî bin. Divê Êzidî, îdareya devera xwe rêve bibin. Xwe zêde têkilî polîtîka herêmê nekin. Bêhtir li ser pirsgirêk û pêşketina devera xwe kur bibin.

Pir giring e ku, tevayên hêzên kurdan, lê bi taybetî PDKI û YNK, parastina Êzidiyan weke parastina nirxên netewî bibînin. Parastin û pêşxistina wan di ser berjewendiya partî û îdeolojiyan re bigirin. Û li ser vî esasî mudaxeleyî nav devera wan, tayînkirina rêvebirên wan ûhwd. nekin.

Ji bo desthilatdariya devera Êzidiyan bi destê wan bê kirin, divê qanûnek bê derxistin û ji aliyê Hikumeta Herêmê ûhwd. bê pejirandin.

c) Di hilbijartinên giştî de, niwênerên Êzidiyan li gorî hejmara wan, cihê xwe di parlementoya Kurdistanê de bigirin. Ev yek bibe qanûn û ji aliyê Hikumeta Herêmê ve bê qebûlkirin.

e) Ji butceya netewî payê wergirin. Pay li gorî hejmara wan bê dayîn.

f) Bi zutirîn wext, li devera Êzidiyan, gundên dur û cihên bi xeter, bi cî bê hiştin û rûniştvan li cihên ewlekar bêne bicîkirin, komkirin. Çarçoveyek, anku kemberek ewlekariyê ji aliyê Êzidiyan ve li dora devera wan bê avakirin. Divê, Kurdên misilman jî di nav de, bê îcaze çi kes nikaribe derbasî devera wan bibe.

g) Avakirina navendekî li Ewropayê, ji bo “Raçavkirina Mafê Mirovan ya Êzidiyan” bê avakirin. Dokument û fîlmên li ser pirsê bêne komkirin. Bi çend zimanan bulten bi şêweyekî sîstematîk bên derxistin. Kurd û dezgehên însanî, hêzên navnetewî li ser pirsê bêne ronîkirin. Têkiliyên hevkarî, dostanî û dîplomasiyê bêne xurtkirin...

- Programek EuroKurd Human Righst li ser pirsê heye an na?

Gabar Çiyan: Belê heye.

Di navenda me du kar têne kirin. Zarathustra News û xebatên EuroKurd Human Rights. Em giringiyê didin arşîvê. Çend beşên me yên xebatê hene:

1) Raporên netewî û navnetewî, li ser pirsa mafê mirovan li Herêma Kurdistanê û raçavkirina mafê mirovan li Herêma Kurdistanê

2) Beşa nû tê avakirin: Raçavkirina mafê mirovan li Rojhilatê Kurdistanê û berhevkirina arşîvê

3) Raçavkirina hovîtiya baasiyên hov yên Sûriyê li ser pirsa mafê Kurdên Başûrê biçûk yê Kurdistanê û berhevkirina arşîvê

4) Berhevkirina zaniyarî û arşîvê li rewşa mafê mirovan li Bakurê welêt…

Her wisa hinek xebatên taybetî jî têne kirin: Berhevkirina dokument, pirtûk, film li ser Gelê Asurî/Suryaniyan. Li ser Cuhuwên Kurdistanê û Êzidiyan. Beşê Ezidiyan hêdî hêdî xurt dibe. Pêwîstiya me bi rapor, pirtûkên li ser pirsê hene. Hêviya me ji gelê me ew e ku, li ser pirsê ji me re ji awira dokumentan ve bibin alîkar. Kesên bixwazin, dikarin bi rêya malpera me: www.eurokurd.net re têkiliyê deynin.

- Tiştekî din heye ku lê zêde bike?

Gabar Çiyan: Gelek spas ji bo eleqata nêz ya Medîa Kurdî. Spasiyên teybetî ji bo xebatkarên ”rizgari.com”ê ku pêşî cî da tevayê vê dosya

taybetî û malpera xwe bi me re pay kirin. Spas ji we re û ji tevayê kesên beşdar re.

www.dergush.com

Derwêş Ferho Dr. Ismail Beşikçi

Prof Dr. Ali Seedo

Serkan Brûsk Salihê Omerî Şermîn Bozarslan

Loqman Bariş Mecîd Heso Serhan Isa

Arjen Arî Gabar Çiyan

**

ŞERÊ KENDAVÊ Û KURD

A.meci Tîgrîs

Cemal Batun

Xorto

Roj bi roj

KENDAVÊ

Ror bi roj

Şerê Kendavê (Xelîcê) û Kurd

Amed T^iis

Cemal Batun

Xorto

APEC

Roj bi roj

ŞERÊ KENDAVÊ Û KURD

Weşanno: 20

Utgivare/Weşanxane

APEC-TRYCK & FÖRLAG

ÇAP Û WEŞANXANA APEC

Författare/Nivîskar:
AmedTîgrîs
CemalBatun
Xorto
Adres/Navnîşan:
Box: 3318, 163 03 SpAnga/SWEDEN
Telefon: 08-761 81 18 •Telefax: 08/761 24 90
"nrmeh 1992
ISBN: 91-87730-25-1
Naverok
Pêşgotin 5
Berî dagjrkirina Kuweytê rewşa Iraqê 7
Di çapemeniya Swêdê de bi kurtasî pirsa
Kendavê 25
Şer destpêku" 44
Kuweyt rizgar bû 94
Kurdan serihilda 105
Trajedtya Kurdan 134
Pirsa Kurd di Koma Neteweyan de 145
Pirsa Kurd di rojeva cîhanê de 171
Heyeta Kurd çû Bexdayê 177
Peymana 1 l'ê Adarê ya 1970'yî 182
Pêşnîyara Bereyê Kurdistanê ji bo
Otonomtyê 189
Pêkhatina herêma Ewlekar 210
Bi Bexdayê re pêwendî 214
Guftûgoh têkçûn 288
Rewşa piştî têkçûna guftûgoyan 293

Dîyart

*Em, vê pirtûkê ji bo bîranîna ew zarokên Kurd ên ku di bin gulebarana helîkopter û scudên rejîma îraqê de şehît ketin;

*Yên ku dayikên wan yên ducanî ji ber gulebaranên rejîmê derbeder û tengezar bûn;

*Yên ku li ser çiyayên Kurdistanê, di nav berf, serma û qeşayê de ji dayikên xwe re bûn re, dîyarî dikin!

Pêşgotin

Wek ku xwendevanên Berbangê pê dizanin, em hersê nivîskarên vê pirtûkê di redaksîyona Berbangê de kar dikin. Ji xwe, me ji hinek nivîsarên vê pirtûkê jî, di çend hejmarên Berbangê de weşandi bûn. Di vê mijarê de, xebatên me hersê hevalan jî cuda cuda hebûn. Heval Xorto di destpêka şerê Kendavê (Xalîcê) de roj bi roj not girtibû. Hevaî Cemal Batun li ser şerê Kendavê û pirsa Kurdan gelek nivîsar nivîsan dibû û bi gelek berpirsiyarên tevgerên Kurd re hevpeyvîn çêkiribûn. Heval Amed Tîgrîs jî, ji roja destpêka şerê Kurd û îraqê bi navê "Roj bi roj" nivîsarên peryodîk nivîsan dibû û beşek jê di Berbangê de weşan dibû. Me hersê hevalan biryar da, ku xebatên xwe bikin yek û bi wan re, ew dokumentên ku li ser vê pirsê hene û derketine berhev bikin û di yek çavkaniyeke de çap bikin. Ji ber vê yekê me bûyeran li gor dîrokê bi rêz kir û dokumentan jî li navê bi cih kir.

Ji derê gotaran me nexwest her bûyereke bi dûr û dirêj şirove (komentar, yorum) bikin. Me vê mafê fîkirandin û şirovê ji xwendevanên xwe yên hêja re hişt.

Ev beşek ji dîroka cîhanê û ya Kurdan a çend mehan an jî çend rojan e. Ji bo rojên pêş Kurd dikarin li ser van bûyeran bifikirin û bigihêne bîrûbaweriyekê. Ji aliyê din ve, bûyera şerê Kendavê û bi taybetî trajediya Kurd ku li ber çavê cîhanê pêk hat, bila wek dîroka me ya berê ji bîr û wenda nebe. Wek dîroka me ya kevin bi gotinên vala û yekalî nemîne. Ji ber ku ev çend meh di dîroka Kurdistanê de gelekî girîng in. Bila di rojên dahatû de gelê Kurd, kirin û bûyerên ku li ser axa Kurdistanê pêk hatin, bê şirove bizanibe. Bila gelê Kurd, çerxa cîhanê, rola rêxistin û pêşewayên xwe bê şirove nas bike. Bi xwe biryar bide. Heger xwendevan di hêla ziman de, hinek zehmetiyan bibînin, bila li me biborin. Ji ber ku pirtûk ji sê pênûsên cuda derketiye.

Kovara Berbangê û rojnamevanê Swêdî Stefan Hagberg ji bo fotografan arşîvên xwe ji me re vekirin. Em ji wan re gelek spasdar in!

Nivtskar

1992Stockholm

Berî dagîrkirina Kuweytê rewşa îraqê

Iraqê, 8 sal bi Iranê re şer kir û di dawî de jî, bi serket. Piştî vê şerê han îraq di nav Ereban de bû xwedî peyv û rêzgirtineke mezin û giran. Bi rastî, eger mirov bi çavekî realîst li encamê şerê îran û Iraqê temaşe bike, dê bigêhe vê baweriyê, ku Iraq ji şer, wekî aliyê serfîraz derket. Piraniya dewletan û bi taybetî yên Rojava û Sovyetê piştgiriya Saddam kirin. Niha baş tê zanîn û di rojname û kovarên mezin û navdar de hate dîyar kirin, ku di destê CIA gelek

wêneyên ku li ser cîh ên leşkerî yên stratejîk yên îranê,
hebûne, ew dane îraqê.
Herweha bi awakî berdewamî, pisporên leşkerî yên
Sovyetê, di xizmeta artêşa Iraqê de bûn. Alîkarî ji welatên
Rojava û Rojhilat her dihatin kirin. Bi komkirina van
tiştên jorîn, Iraq di dawiya 1980 -an de sîstemeke leşkerî û
çekdarî ya herî nûjen û bilind pêk anî.
Hêzên Kurdên çekdar û merkezên wan, ji ber êrîşên
kîmyewî û çekên giran hema hema li nav axa Kurdistana
Başûr neman. Partî û hêzên Kurd, merkez û pêşmêrgeyên
xwe ji Kurdistana Başûr kişandin herêma Kurdistana
îranê. Saddamê faşîst, piştî serketina şerê li dij îranê Kurdistanê
carekê din çol û wêran kir.
Lê, şer bi xwe re barekî gelek giran anî ser aboriya Iraqê.
Deynê Bexdayê, nêzî 100 milyar dolar bû. Bêkarî gelekî
zêde bû. Ew bû pirsek ji yên herî girîng. Gelek kargeh nedikarîbûn
kar bikin an jî berhemên wan kêm bûn. îraq, di
krîzeke bê ser û ber û kûr de bû. Ji serxweşiya serketina
şerê îranê, divê Saddam planên êrîş û dagîrkirineke nû
bidîta û wê pêk bihaniya.
Hêzên Saddam Kuweytê dagîr kir.
Di roja 2'ê Tebax a 1990 'î de, ajansên dinyayê, ev nûçe
ya sensasyonel belav dikirin:
Hêzên leşkerî yên Iraqê, cîranê xwe Kuweytê
dagîrkirin" !
Çend roj berê jî, nûçeyek belav bû, ku îraq dixwaze
êrîşeke leşkerî bibe ser Kuweytê. Lê, Amerîka bi xwe
derewbûna nûçeyê dîyar kir. Di roja 2'ê Tebaxê de ,derew

û xeyal bûn rastiyeke berbiçav û Kuweyt ji aliyê Saddam ve hat dagîrkirin.

Çima Kuweyt?

Kuweyt, ne bi tenê h Rojhilata Navîn û nav dewletên Ereb de welatekî dewlemend e. Herweha ew di cîhanê de dewleteke herî dewlementir e. Di belavkirina xezîna dewletê (butçe) de, ji her Kuweytî re 15 hezar dolarê Amerikayê dikeve. Herweha ev dewlemandiya Kuweytê bûye sedema pêwendiyên xurt ku di navbera Kuweytê û dewletên din ên cîhanê de pêk tên. Ji sala azadbûna xwe - 1961)an) ve heta niha, bi taybetî jî nêzîkahiya Kuweytê bi welatên Rojava û DYA bihêztir bûye.

Di şerê Iraq û îranê de, welatên Kendavê (Xelîcê), 30 milyar dolar alîkariya Iraqê kirin. Ji wan 14 - milyar dolar ji alî Kuweytê ve hatibû dan. Piştî rawestana şer, gava peyv hat ser vegerandina van peran, di navbera îraq û Kuweytê de dijîtiyên mezin dest pê kirin. Iraqê ji dervê vê destpêkir daxuyanîyên weha belav bike - " Kuweyt beşek ji axa Iraqê ye, ku sazbûna vê dewletê meşrû nebûye .(!)Tebîî ye, her kesî ev pirs dida - baş e, piştî dewletek

8

I ii7nnnpii?iRQ

serbixwe bi dîrokek 30 - salan, gelo çawa îro Iraq pirseke weha têne holê." Lê, dihat jibîrkirin, ku li aliyê din ê medalyonê Saddam Huseyn û BAAS hebûn. Heta di destpêka rojên van dijîtiyan de, piştî pêwendî li gel nûnerên rejîma Bexda û yên Kuweytê, Serokkomarê Misrê Husnî Mubarek û Qralê Urdinê Huseyn, dîyar kirin, ku " Iraq êrîşê

Kuweyt nake ! " Piştî du rojan, leşkerên Iraqê ji telewîzyon
û radyoya Kuweytê bangkirin, ku " ji bo piştgiriya gelê
Kuweyt, da ji serokatiya gemar ya Şeyh Sabah xelas bikin,
ketiye axa Kuweytê û dest daniye ser mekanîzma dewleta
Kuweytê" .
Bi vî awayî, dê nêzîkî ji sedî 10, petrol a dinyayê di bin
hîzmeta Saddam û rejîmê wî bibûya. Çawa jî bûhayê
zerê reş " zêde kiribana, pêwist dibû her kes gûhdariya wî
bike. Bi kurtî dinya dê mecbûrê Iraqê bibûye (!) Wî bi kevirekî
du çûkan bikûje ! Saddam dibû xwedî dewlemendiya
zêrê reş û her weha pirsa demokrasî û pirsa neteweyî
ya Kurd li Iraqê dê bihata veşartin.
Eniya fireh li dij îraqê
Ji roja wergirtina Kuweytê ve li hember Iraqê, di
destpêkê de ji bal DYA, welatên xwedî granî li Ewropa
Rojava - wekî Brîtanya, Fransa, îtalya û hwd. ji dervî
Yemen, Sudan, Lîbya ve hemû welatên Ereb reaksîyonek
dane diyarkirin. Paşê ji Rêxistina Yekîtiya Neteweyan
)RYN) di dîroka xwe de biryarên herî tûj li dij Iraqê girt.
Suudî Erebistan, Qatar û Bahreyn ji ber îhtîmala êrîşên
Saddam daxwaz kirin ku leşkerên DYA (Amerîka,(
Ewropa Rojava, Misir û Suriye, bên nav axa wan. Wan
welatan dest bi şandina leşker kir.
Iraq bi hezaran insanên biyanî yên ku li Kuweyt û Iraqê
kar dikin û bi taybetî welatiyên Amerîka, Fransa, Brîtanya
û yên welatên din ên Rojava girtin. Li gor daxuyaniya Partiya
Demokrat a Kurdistanê, ew niha wekî mertalên parastinê
di kargehên çekên kîmyewî, çekên din û cîgehên

eskerî de, hatina bicîhkirin.
Serokkomarê Amerikayê Bush, Saddam wekî Hîtlerê nû bi nav kir. Yekîtiya Sovyet xwest, ku Iraq bê qeyd û şert ji Kuweytê derkeve. Wezîrê Derve Shevardnadze got, "ku Iraq çekên Sovyetê yên ku ji bo parastinê hatine firotin, ji armancên xwe yên êrîşkarî re bikar aniye. " Brîtanya, Fransa, Almanya peyvên wekî zordar, qatil, dizê Bexdayê û hwd. hemberi Saddam gotin. Gelo ev hemû ne encama wekî di gotina pêşiyan a Kurdan de tê gotin " Xwedîbike bi nanê xwe û berde canê xwe " ye? ...
Bi van hemû tiştên jorîn ve, gelekî baş dîyar bû, ku dinya 11 pêşberî hemû zilm, zordari û jenosîdên Saddam li hemberî neteweyekî ji deh salan ve bêdeng mabû. Gava
10
pirs dihat ser berjewendiyên wan ên aborî û neteweyî, bi xurtî dengên xwe bilind dikirin. Saddam û BAAS ên ku fêr bûbûn çi bikin ji bo wan bimîne, vê carê gavên xwe şaş avêti bûn. Bersiva xwe jî gelekî zû girtin : Saddam pêwist bû cezayê şaşîtiya xwe bide ! Saddam dîktator bû, faşîst bû! Nimûne jî gelek bûn: Tiştên ku pêşberî Helepçe û Badînan kiri bû, her roj di telewîzyonan de dihatin nîşandan. Gava Saddam bi zarokên Brîtanî re, di telewîzyona Iraqê de xwe nîşan dida, wekî mirovekî " zarokperwer ,"telewîzyonên dinyayê paşî zarokên Kurd ên ku bi çekên kîmyewî hati - bûn şehîd kirin, di programên xwe de diweşandin. Her kesî niha baştir didît, ku Saddam li dij Kurdan çi kiri bû...
Helwesta Tirkiye, îran û Suriyê

Welatekî ku beşek Kurdistanê dagîrkiri bû ji aliyê hemû dinyayê ve dihat rûreş kirin. Gelo eger şer derkeve, pirsa Kurd dê bi tevayiya giraniya xwe neyê rojevê ji bo çareserkirinê ? Ev bû pirsa herî girîng di pêşiya jiyana siyasî ya Ankarayê de. Li gor dîtina aqilmend û şêwirmendên Tirkiyê, pêwist bû, ku dewlet bi awakî aktîv di krîz a Kendavê de cîh bigre, ji bo ku bikaribe bibe asteng di pêşiya aktuelkirina pirsa neteweyî ya Kurd de. Ankarayê, piştî biryara embargo ya aborî ya Rêxistina Yekîtiya Neteweyan, xeta petrolê di navbera Kerkûk - Yumurtalikê de girt. Parlamentoya Ankarayê biryar girt, ku hukimet dikare di şerê Kendavê de biryara şer bide û leşkerên bîyanî li Tirkiyê bicîh bike. Gihişte vê encamê, ku Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal dîyar kir : " Eger Amerîka li bakûrê Iraqê dewletek Kurd çêbike, em ê bi ordiya xwe bikevin wir û wê xerab bikin ". Ev nîşaneke din bû, ku dîsa av ji devê Tirkan tê ji bo bidestxistina petrola Kerkûk û Musilê.

11

Jî îzolekirina Iraqê ji bal welatên cîhanê ve, belkî îranê feydeya heri mezin dît. Bexdayê daxuyanî da ku, peymana Cezayirê ya 1975 - an qebûl dike, dîl ên şerê Iraq û îranê dê bêne guhertin, ji axa îranê jî ya ku di dest de ye dê derbikeve. Daxwaza aştiyê û başcîraniyê jî, ji Tehranê kir. Wezîrê derve yê Iraqê çû îranê, ku pêwendiyan deyne. Lê, îranê piştî van hemû tiştan jî, nîşan da ku piştgiriya biryarên RYN dike. Piştî çareserkirina pirsa Kuweytê Tehranê dîyar kir, ku divê leşkerên dewletên din ji herema Rojhilata

Navîn derbikevin.
Suriyê reaksiyoneke xurt li dij Iraqê nîşan da û 4 hezar leşker şand Suudî Erebistanê. Şam dixwaze vê hejmarê zêdetir bike.
Ma ji derê çareserkirina pirsa Kurdan aştî dibe?
Wekî hate dîyar kirin, piştî wergirtina Kuweytê ji aliyê Iraqê ve, bi taybetî Kurd ên dervî başûrê Kurdistanê baş dibînin, ku birayên wan li hember çi mekanîzmek leşkerî bihêz, ev 30 sal in bê rawestan şer dikin. Di dîtinek me, bi endamek ji Polît Buro yê Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê re, li ser rewşa Iraqê wî weha digot:
-Me 54 rojan bi berdewamî sîng bi sîng, bi 30 hezar leşkerên Iraqê re, yên ku bi çekên giran, helîkopter û balafiran ve dihatin parastin di 1988 - an şerek bideng da. Pêşmergeyên qehreman 8 hezar leşkerên Iraqê kuştin û 25şehîd dan. Leşkerên Iraqê yek gav nedikarîbûn pêş bikevin, her paş jî ketin. Lê, dewletek wekî Kuweyt bi mekanîzma ya leşkerî, tank, balafir û rakêtan ve, di çend saetan, ket!
Baş tê dîtin û ev rastiya herî mezin e, ku bê çareserkirina pirsa Kurd li Rojhilata Navîn dê aştiyeke berdewamî nabe. Berî her tiştî jî, îro li ber çavan e, ku welatên
12
dagîrker ên Kurdistanê ne tenê astengên pêşiya tekoşîna neteweyî ya Kurd in, ew astengê pêşiya ewletî ya heremê û cîhanê ne jî.
Cemal Batun
l'ê Çileyê Paşîn:

Do li paytextê Swîsre, Cenewreyê hevdîtina di navbera
Wezîrê Derve yê Iraqê Tariq Azîz û yê Amerikayê James
Baker de 6-saetan dom kir. Herdu wezîran bi hevdu nekirin
û civîn bê encam belav bû. Her du wezîran jî di presskonferansên
xwe de dîyar kirin, ku ji bo dîtinên xwe paş
ve gav avêtinê re ne amade ne. James Baker got, ku:
-Ez ne tenê ji bo hevdîtinê hatim vê derê. Ez hatim, ku
eger Iraq ji Kuweytê dernekeve, dê çi bê serê wan! Min
xwest ez vê tiştî bi wan bidim fam kirin.
Tariq Azîz ji aliyê din dida diyarkirin:
-Em bi her tiştî dizanin û em amadeyê her tiştî ne.
Berî ku rojnamevanan nûçeyên xwe birêbikin, nûçeya
dijwar ji Bexdayê dihat, Saddam ji wir qîrîna xwe digihand:
-Em ê, Amerîkiyan di xwina wan de bifetsînin!
Ji daxuyaniyên, hatin belavkirinê diyar e rewş ber bi şer
de diçe, lê hin komikên siyasî, daxwazin kar û barek
dawîn ji bo aştiyê bikin. Dibêjin, ku siyasiyeke bê alî bi berpirsiyariyek
rabe, dibe ku aliyek ji bo çareserkirina pirsê
xwe nerm bike. Ji ber vê yekê tê gotin, ku Serokê Yekîtiya
Netewan Perez de Cuêllar, dê dawiya heftê biçe Bexdayê.
Bê guman, aliyekî ku herî zêde li bûyeran temaşe dike,
em Kurd tên. Kurdên başurê Kurdistanê û Kurdên li
perçeyên din, ji roja dagirkirina Kuweytê ku ji aliyê Iraqê
ve hate kirin heta îro, tû pêngaveke nêzîkayiyê ber bi hev
ve havêtine tune ye. Bi ser vê jî Partiya Sosyalîst a Tirkiyê,
13
di bin serokatiya Ferit îlsever de û kovara " 2000'e dogru"
)Ber bi 2000-an), dixwazin bi taybetî bidin nîşandan, ku

Kurdên başûrê Kurdistanê li gel siyaseta Amerîka cî digrin. Dibêjin, ku Kurd bi hêviya şerekî ne û ji wî şerî feydan ji bo xwe derbixin. Ev a " avêtina gazê, ser agir e" û ji derketina şer re alîkarî dike, dinivîsin xwediyê gotinên jorîn. Herweha daxwaza van kesan, cî girtina Kurdan û Tirkiyê li gel Iraqê ye. Bersiva Kurdan ji van kesan re, hişk û kurt bû - " Bere kes daxwaza cîgirtina me li gel qatilê me Saddam ne ke!" Tirkiyê ji xwe h gel Hêzên Hevkar ciyê xwe standibû. Lê, şertê xwe jî anîbû zimên, divê yekîtiya sînorê Iraqê bihatibane parastin. Li Iraqê Kurd hebûn, di rewşa şer de an di dawiyê de dibû, ku Kurdan guhartin di sînoran de pêk anîbane. Rewşeke wusa berî her tiştî, wî tesîra xwe li Kurdên bakurê Kurdistanê bikira. Tirkiye ya,ku ji tiştekî wusa ditirsiya, ji Hêzên Hevkar soz a ewletiya sînoran dixwest. Di nûçeyên, hatin belavkirin ji bal danezanên ragihandinê ve, ev soz hatibû standin. Nûnerekî Amerîka, yê ku hatibû Tirkiyê ev daxuyanî dida:

"Siyaseta Amerîka le ser pirsa Kurd, çareserkirina dê bi riyên aştî û li gor mafên mirovatî, di navbera sînorên, dewletên ku Kurd lê dijin e. Dewletên Yekbûyî yên Amerîka bi karên hundurî yên welatan mijul nabe".

Kriza Kuweytê, tirsek xiste dilê Ankarê, ku li ser gelek buha bibe. Pêngavin pêwist-bû bêne avêtin, da rê li ber ên meztir bê girtin. Wusa jî kirin.

Welatên Ewropa-Rojhilat, ji girîngiya xwe di rojeva si yaseta cîhanê de, gelekî dûr ketibûn. Tirsa Sovyetê yan çirokên, ku bi navê welatên bakûr ên ji " perda hasinî"

qediyabûn. Hevdîtinên ji bo kêmkirina çekên nukleer û
yên din bi carekê, bi peymanan hatin imzakirin. Lê,
Tirkiyê dixwest, Rojhilat û Bakûrê Rojhilat (bakûrê Kurdistanê
(dervî van peymanan bihêle, lê çawa ? Vê carê jî
14
babeta - Başur, Ankarê destpêkir bikar bêne. Li gor wê, tirs
ji dewletên Ereban, Suriye û Iraqê dikari bû werê Tirkiyê.
Wekî her carî di danezanên ragihandinê de şîretvanên"
navdar " destpêkirin, ku diyar bikin - çawa ji ber pirsa avê,
dibe ku li Rojhilata Navîn şerek li dijê Tirkan bibe.
Di rewşeke wusa de, gava Krîza Kuweytê dest pê kir,
Tirkiyê tiştê ku li ezmanan digera li erdê peyde kir. Di
Konferansa Hevkari û Ewletiya Ewropa de, ya ku di rojên
'21-19ê çiriya paşîn de li paytexta Fransayê Parisê civiya, biryara
"Di navde Mersîn, Rojhilat û Bakûrê Rojhilat a
Tirkiyê (bakûrê Kurdistanê) derveyî peymana
kêmkirima çekan dima. Bi vî awayî ji paralela 39 -an ve
tevayiya bakurê Kurdistanê, bi xeta Muradiye, Karayazi,
Tekmen, Kemaliye û Gozne ve, ber bi deryayê, derveyî
kêmkirina çekên klasîk û çavdêriyê di man." (Kurdistan
Press(
Bê guman ev peyman ne bi tenê, bi daxwaza Tirkiyê bû,
ew bi daxwaza Ewropayê jî bû. Di Rojhilata Navîn de, di
bin siya Tirkiyê de xwedîbûna serbazekî (asker, jandarma
(tiştek xerab nebû. Kurd ? Di rastiya roja me de, heya
kesî ji yê din ne bû. Her kesî li belaya serê xwe re diva wî
çare dîtibane. Di rewşa, ku sosyalîstên-romantîk mîna
Fîdel Castro çepik ji Saddamê Tekrîtî re lêdixistin,

wêrankirina Kurdistanê, bicîkirirna çekan li ser erdên Kurdan xema kesî nebû.
Rojhilata Navîn ber bi şerekî mezin ve diçe, lê di nava vê rewşa xeter de li bajarekî wekî Diyarbekrê, ya ku hejmara rûniştvanên wê digêhe nîvmilyonekê, xelk nizanê çawa xwe ji êrîşeke kimyewî biparêze. Bi milyonan Kurd bi nezanîbûna , ku çi dê di van rojan de bi qewime xwe spartine xwedê.
Serneketina hevdîtina Cenewreyê di navbera Bajker û Azîz de, rengekî tarîtir da bûyera Krîza Kuweytê. Pirsa dem di rêza yekem a rojeva siyaseta cîhanê de rûnişt.
15
Wekî ku tê zanîn, biryara Yekîtiya Netewan, girêdayî rewşê ye, ku Iraq heta 15'ê Çileyê Paşîn xwe ji Kuweytê nekşîne, bi çareserkirina pirsê bi metoda şer heye. Niha di kulîsên siyasî de behsa şer ê berê 15-ê mehê jî tê kirin. Civîna do germbûneke zêdetir dan van qisan.
Hê berî destpêka şer, dîyar e, ku dê Kurdistan bibe qada şer. Hemwelatî ji niha ve, li ezmanên xwe benda balafirên şerê ne. Tirs û tatêlê wan girtine.
ll'ê Çilêyê Paşîn
Tirsa şer ji do ve bi ferehî xwe xista jiyanê. Konsolos û dîplomatên dewletên Rojava yek bi yek ji Bexdayê bardikin. Hêzên NATO yên leşkerî ji bo bihêzkirina eniya şer li dijê Iraqê neqlî heremê dibin. Komîta Parastina Netewî ya Tirkiyê li ser vê rewşa "nazik" civînan dike. Ji aliyekî ve qala metodên parastina sivîlî û ji aliyên din ve jî qala" li hember sabotajên Iraqê yên ku dibê bibin, wezîfekirina

Hêzên taybetî "- di rojnameyên Tirkan de, tên kirin.
Gava, bala dinyayê hemû xwe daye ser Krîza Kuweytê û Rojhilata Navîn, Gorbaçov jî xwe dide ser welatên Baltiqê. Serbazên Sor, ên ku dezgehên resmî yên Lîtvanya dagîrkirin, bi netewiyên Lîtvanî re sîngên hev dikşînin. Li ser pirsa Tengava îranê, nederketina tû encamên bi dilê Amerîka ji hevdîtina li Cenevreyê, rê da ku welatên din jî bikevin dorê. Serokkomarê Fransayê F. Miterrand di vê derdorê de diyar e dê bi xwaze rolekê bileyze. Her çend welatê Kurdan di nav vî agirî de, pirseke herî girînge, kes nayêne rojevê. Di kulîsên sîyasî de dibe, ku pirsa Kurd bê axaftin, lê di danezanên ragihandinê de tiştekî xwiya nîne. Belê dîyar e dê li ser pirsa Filistîniyan guftûgo çêbibin. îraq merca ji derketina Kuweytê, bi" çareserkirina" pirsa Filistîn ve girêdide. Bi vî awayî, çareserkirina Krîza Kuweytê ji xwe re riyên cuda di

deyne. Di riyekî ji wan de Kuweyt, di yekê de îraq û di yan dî de jî îsraîl dîyar dibe. Wekî, ku tê dîtin di tû riyê ji wan de Kurd tune ne.

'12ê Çileyê Faşîn

Ji bo qedandina dema derketina Iraqê, ji Kuweytê, li gor biryara YN sê roj man. Serokê YN, Perez de Cuêllar îro li Bexdayê Saddam dibîne. Tê gotin, ku Cuêllar dê planeke aştiyê pêşkeşî Saddam bike, yê ku ji 5 xalan pêk tê.

-îraq divê di 15'ê Çileyê Paşîn de, ji Kuweyt vekişe.

-Bi vî awayî garantî tê dan, ku tû êrîş dê neçin ser îraqê.

-Leşkerên hêzên Hevkar jî yên ku di bin pêşengiya

Amerîka de li heremê ne, dê ji heremê derkevin.
-Derketina hêzên leşkerî ji Kuweytê, di bin çavdêriya hêzên YN de dê pêk bê.
-Ji bo bidarxistina Konferenseke navnetewî li ser Rojhilata Navîn, ku di demek herî nêzîk de kom bibe, dê bang bê kirin.
Niha her kes li hêviyê ye, dê Saddam bi çi awayî li ser van xalan dîtina xwe diyar bike.
Li aliyê din, li Yekîtiya Sovyet bûyerên li Lîtvanya her û her germtir dibin. Netewevanên Lîtvanî beşdariya xwe ji bo rewşên dijwartir dikin. Serbazên Sor hemû dezgehên resmî û avayiya televizyonê xistine bin çav. Li Rojhilata Navîn û li welatên Baltik, qêrînên duruşmeyên (slogan(şer tên. "Ku şer derbikeve hûn ê êrîşê bibin ser îsraîl ?" Ji vê pirsê re, bersiva Tariq Azîz, wezîrê derve yê îraqê, kurt hate dan:
-ji sedî sed!
Li aliyê din, di çolên Suudî Erebîstan, Wezîrê Derve yê Amerîka James Baker wusa ji leşkerên Amerîkayiyan re digot:
-Di 15'ê çilêya paşîn de, em derbasî êrîşê dibin.
17
'13ê Çileyê Paşîn
Kongra Amerîkayê, mafê biryara şer da Bush. Heta îro tû agahdarî li ser hevdîtina di navbera Perez de Cuêllar û Saddam de, çawa derbasbûye nehatiye belavkirin. Herweha xwepêşandanên H dij şer li Ewropayê zêde dibin. Lê, diyare ev a, dê nikaribe rê li ber bûyeran bigre.

Li "Rojhilat û Bakûrê Rojhilata Tirkiyê " xelkê ku nêzîkî sînor dijî, mal, gund û bajarên xwe berdidin û barî rojavayê Tirkiye dikin. Maskeyên li dij çekên kîmyewî hîn jî li gel nehatine belavkirin.

Pêngavên dewleta Tirk carekî din didin xuya kirin, ku çekên kîmyewî li dij Kurdan bêne bikaranîn, dê tenê kêfxweşiya wan be. Ji dervî wê, siyaseta dewleta Tirk, heta niha ew bû, ku Kurd dev ji welat û axa xwe berdin û

barkin rojava Tirkiyê. Armanca vê siyasetê jî, " bê av hiştina masî bû ". Bi vî awayî pêwendiyên pêşmergeyên Kurd û gel dê bêne birîn. Ji bo gihiştina vê daxwaziyê jî du rê hene. Yek : yan pêwist e mirov bêne paqijkirin, an rayên wan ê bi axa wan re bêne birîn. " Wekî welatekî Ewropa " Tirkiye nikare jenosîdên wekî yên Saddam, mîna li Helepçeyê pêk bêne. Ji ber wê jî riya din tê bikaranîn. însan ji welatên wan, an bi darê zorê, yan jî bi siyasetê tên derxistin. Tirkan ji berê jî ev kar kirine û niha jî dom dikin.

Perez de Cuêllar ji Bexdayê vegeriya. Xuya ye, ku Sekreterê Giştî yê YN, ji Bexdayê bi encamekî bidestketî nedaye rê. Ji bo, bi Saddam re hevdu bibîne, Cuêllar ê ku 2 - 3 seatan li bendî ma, li ballafirgehê bi tenê ji aliyê Yaser Arafat ve hate birêkirin. Tariq Azîz jî, ji bo Ijirêkirina Sekreterê Giştî yê YN neçû balafirgehê. Di daxuyaniya xwe ji bo hevdîtina Bexdayê û ji bo pirsa derketina şer, Cuêllar wusa bersiv da : " Xwedê dizane" !

Li paytextê Lîtvanya Vîlnîus çek teqîn. Li gor nûçeyên

hatin belavkirin, di şerên di navbera Serbazên Sor û neteweyiyên Lîtvanî de 14 kes hatine kuştin.

'14ê Çileyê Paşîn

Piştî saet 24.00 -an dema ku ji bo Iraqê, ji aliyê YN ve hatiye naskirin diqedê. Her kes di baweriya derketina şer de ye. Piştê, Cuêllar li ser babetê tiştek bidest nexist û her tişt ber bi xwedê ve hişt, tirsa şer dilê milyonan mirov girtiye. Ku îro yan beyanî tû tiştekî "nedîtî " pêk neyê, tê mana şer di navbera Iraqê û Hêzên Hevkar de. Em meyzênin, gelo Serokê Fransa F. Mitterand dê çi bikaribe bike?

Pisporên leşkerî dîtina xwe didin diyar kirin, ku şer dê gelekî kurt dombike. Dinya gava van bûyerên mezin dije.

19

Kurdan dîsa xwe naniye rojeva siyasî. Ne di warê leşkerî, ne di warê siyasî û ne di warê dîplomasî de Kurdan heta niha tû gotin nekirine. Xuya ye, ku ji kirinên wusa dûr in jî. Di vê demê de agahdariya, pêşniyara Bereyê (Eniya(Kurdistana Iraqê, ji bo pêkanîna Konferansa Netewî hat. Lê, ev pêşnîyar heta bikeve jiyanê, dîyar e dê ji bin kayê ve gelek av derbas bibe.

'15ê Çileyê Paşîn

Derketina şer girêdayî saetan e. Ew dema ku YN ji bo îraqê dabû dîyar kirin, îro 07.00 de diqede. Tê gotin, ku hêzên Hevkar di bin serokatiya DYA de, bi qedandina kathejmarê re dê dest bi êrîşê bikin.

Wekî tê xuya kirin balafirên êrîşan di şer de dê rola herî girîng bileyzin. Li her du eniyan rewşa hebûna balafirên

leşkerî bi vî awayiye : Hêzên Hevkar xwedî 1851 hejmar balafiranin, ên ku li basên Suudî Erebistanê bi cî kirine. îraq xwedî 550 balafiran e. Gava mirov li van hejmaran mêze dike, dibîne ku Hêzên Hevkar bi giranî xurtbûnê di destê xwede digrin.

Dîyar e, ku Iraqê wekî gava yekem a parastinê, li hemberê êrîşek ji erdê ya hêzên Hevkar ji Bassenên xwe li Suudî Erebistanê, gelek tişt pêkanîn e. Ji aliyê sînorê Kuweytê ve pêşberê Suudî Erebistanê, şeş xet hatine kolandin. Di xeta yekem de petrol hatiye dagirtin. Gava êrîş were dê ev petrol bê pêxistin. Bi vî awayî durdîtina leşkerên hêzên Hevkar ji ber dû yê petrolê, di şerê erdê de bibe astengek mezin. Di xeta duwem de mayin hatine bicîkirin. Di xeta sêyem de têlên tûj hatine rêzkirin. Di xeta çarem de leşkerên taybetî û tank hene. Di ya pêncem de topên giran hatine danîn. Di xeta şeşem de jî fuze dê pêşberê leşkerên Hevkar hebin. Ji bo ku hêzên Hevkar bikevin Kuweytê pêwist e, van hemû astengên li pêş xwe

rakin. Ji ber vê çendê jî wekî destpêk êrîşek ji erdê jialiyê leşkerên Hevkar kêm tê dîtin. Tebîî ye ku rakirina wan jî dê demekî dirêj bigre. Hêzên Hevkar ji vê dema dirêj dipelkînin.

Şer dê şerê balafiran be. Wusa dîyar dibe. Bi êrîşên dijwar ji ezman ve, bass û ciyên stratejîk ên leşkerî yên ku xwîn didin rayên hêza şer a Saddam dê bên hilweşandin. Dê li hember êrîşên ezman, parastina leşkerî ya Iraqê çend xurt be, em ê bibînin. Di şerên îroyîn de her çend girîngiya

moralê hebe jî, lê peyva herî dawî ya teknolojiya bilind a leşkerî ye.
Di proseseke wusa dijwar de, Kurd û rewşa wan tê ber çavên mirov. Bi dehhezaran, sedhezaran xortên Kurd, ku niha di ordiya Iraqê de leşkeriyê dikin, dibe ku piraniya wan di eniya pêşîn a şer de bin. Ew ên ku çek berdin, dê bikujin û bên kuştin.
Ji bo çi ? Ji bo hatina xwe, rojên ronî yên zarokên xwe, ji bo welatê xwe, axa xwe, serbilindî û şerefa neteweyê xwe? Na!
Ma tenê ew. Herweha di ordiyên welatên din ên dagîrkerên Kurdistanê jî. Di şerê 8 salan di navbera Iraqê û îranê de, li her du aliyên eniya şer bi hezaran Kurd hebûn. Him ji bo îran û him jî ji bo Iraqê şer dikirin.
Gelek caran berên çekên wan, li laşê birayên wan ên Kurd diketin. Kurd bi çekê dagîrkerê welatê xwe, birayê xwe yê Kurd dikuştin. Ma gelo ev jî ne trajediyek herî bi şerm a sedsala me û rastiya roja me ye. Ev trajedî bi dehên, bi sedên salan û vir ve dom jî dike.
Dewletên dagîrker ên Kurdistanê ji dervî ku dest danîne ser dewlemendiya Axê (xakê), dest danîne ser mafê jîyana mirovê Kurd jî. Ji bo berjewendî û parastina xwe bi xwîna xortên Kurd jî dileyizin. Ji aliyekî axa Kurdan dimijin, ji aliyê din bi xwîna Kurd hebûna xwe diparêzin.
21
Maskeyên Kurdan mirîşk in
Berî ku çekên kîmyewî yên Saddam bên bikaranîn, bi

sedhezaran kes ji vê tirsê ji bakurê Kurdistanê bar dikin. Ber bi bajarên Tirkiyê yên rojava wek Stanbol, Izmîr, Bursa û Ankarê ve direvin. Yên belengaz û xizan ku nikarin ber bi bajarên Tirkiyê ve birevin, derî û pencereyên xwe bi naylonan digrin. Mirîşkek li ba pencera xwe girê didin û sibehê zû di pencera naylonkirî de temaşe dikin ka mirîşk mirîye an na. Heger mirîşk sax be, jahr û gaza Saddam bi top û balafiran îşev jî nehatîye avêtin û piştre derdikevin der. Maskeyên Kurdan mirîşk in. Li herêma Kurdistanê mirîşk neman, ku xelk bikire. Ji ber tirsa gaz û jehra Saddam bajarê Batman, Mêrdîn û Dîyarbekirê hema hema vala bûne.

Pêşniyara Fransa di YN de, ji bo nederketina şer û çareserkirina pirsê bi riyên aştiyê, ji bal Yekîtiya Sovyet ve jî piştgiriyê dibîne. DYA, Brîtanya û îsraîl li dij vê pêşniyarê derdikevin. Ji bo derketina îraqê ji Kuweytê, pêşniyara Fransayê, ku Konferansek Rojhilata Navîn a tê de pirsa Filistînê bigre desta ji aliyê DYA, Brîtanya û îsraîl ve meqbûl naye dîtin.

Herweha li Tunisê, di êrişeke pêşberê meqera navendî ya Rêxistina Rizgariya Filistînê (RRF) de, sê kes hatin kuştin. Weke tê gotin yek ji wan zilamê heri nêzîk ê Yaser Arafat e.

Li Enqerayê di daxuyaniya, ku ji danezanên ragihandinê re belavkir, Suleyman Demîrel (Serokê Partiya Riya Rast(nîşan da, ku li gor agahdariyên wî yên taybetî hene, îro di kathejmar 21.30 de îraq dê hêzên xwe ji Kuweytê bikşîne. Ev daxuyanî di demek gelek kurt de hate weşandin û niha

her kes li hêviyê ye, gelo ev agahdarî çend rastin.
Ji bal TV, radyo û rojnameyên cîhanê ve, li ser tê rawestan, ku eniya duwem a li dij Iraqê dibe li Başûr û başurê
22
Rojhilata Tirkiyê bê (bakûrê Kurdistanê). Ji niha ve jî, li wê de gelek çek hatiye bi cî kirin. Bassa Erhaç a li Melet yayê, ya Diyarbekir û Batmanê bi balafirên leşkerî û fîloyên hêzên leşkerî yên hewayê ve hatine dagirtin. Her weha spesialistên (pisporên) şer ên NATO yê û DYA yê di van ciyan de amade ne. Fuzeyên, ku hember armancên dûr in jî di van bassan de hatine danîn. Lê, yek peyv jî li ser rûniştvanên vê axê yên bi milyonan in nayê gotin. Ji bo şer dernekeve pêşniyarên bidarxistina konferansên li ser Rojhilata Navîn têne kirin. Naveroka van konferansan jî li derdora pirsa Filistînê tê dîtin. Cî ji bo pirsa Kurd nayê diyarkirin. Hebûna vê pirsa girîng kes naxwazê bibîne û ne jî li ser bipeyîve. Tenê gava qala zordariya Saddam tê kirin, di televizyonên cîhanê de resmên Helepçe. Çend gotin jî li ser Kurdan têne kirin. Hevqas! Roj diqede, lê daxuyaniya Demîrel rast demeket. Hêzên Saddam ji Kuweytê nevekşiyan. Konseya Ewleyî ya YN piştî çend saet civînê li hevdu nekir û tû biryar a pêşniyareke nû jî demeket. Vê carê Perez de Cuêllar U ser navê xwe ji Saddam rica kir, ku ji Kuweyt hêzên xwe vekşîne. Lê Bexda diyar e, ku ne amadeye bersiva Serokê YN bi awakî pozîtîv bide. Her deqîqa diçe hêviyên riyên çareserkirina pirsê bê şer kêmtir dike.
'16ê Çileyê Paşîn

Dema, ku YN ji bo derketina îraqê ji Kuweytê re naskiribû qediya. Niha bersiva dawî dê çek bidin. Bûyer çawa gihişte vê nuxteyê, bi kurtî wusa bû:
Di 2'yê Tebaxê de hêzên Leşkerî yên îraqê sînorên Kuweytê derbaskirin û di navbera çend saetan de hêza parastinê ya dewleta Kuweytê perçiqandin. Kuweytê dagîrkirin. Piştî hefteyekê Kuweyt wekî herema 19 - an a îraqê da xuyanî kirin.
23
Dagîrkirina Kuwetê, ji bo cîhanê bû şok. Lê wek tê zanîn dijîtiya di navbera Iraqê û Kuweytê de demeke dirêj dom kir. Bi hefteyan nûnerên her du dewletan, hevdu dîtin, ji bo çareseriyê ji dijîtiyan re bibînin. Her di navbera van hevdîtinan de Iraqê hêzên xwe yên leşkerî ber bi sînorê Kuweytê ve bicî kirin.
Dijîtiya di navbera her du dewletan, destpêka xwe hîn di şerê Iraq û îranê de dabûn diyarkirin. Welatên Xelîc pereyên ku bi deyn dabûn Iraqê di heşt salên şer de paşve dixwestin. Di nav wan de bi taybetî Kuweyt deyn dabûn û ji pereyên dayî derbas nedibû. Di hefteyên berî 2'ê Tebaxê de Ira -qê gelek tohme ji Kuweyt re nîşandidan. Li gor wan, Kuweytê ji pêwist zêdetir petrol dibir bazarê, vî tiştî jî bi xwe erzaniya petrolê di bazarên cîhanê de dianî. Ev pêngav a Kuweytê ji bal Iraqê ve wekî tehdîdek li dij Iraqê dihat dîtin. Herweha Iraqê digot, ku Kuweytê ji bîrên petrolê yên Rumalia, ya ku ji bal her du dewletan ve tê bikaranîn, petrol zêdetir derxistiye. Bi peyvên din - petrol ji Iraqê diziye ! Wekî din jî Bexdayê çavên xwe berdabûn axa

Kuweytê, bi taybetî Warba û Bubiyan ê. Her du cî taybeti yek wan a giring ji bo Iraqê hebû. Ji ber ku bi van her du ciyan Umm Qasr, a ku ciyê derxustina tankêrên xwe yên deryayî ber bi cîhane ve bû, di bin kontrola Bubiyan û Warba de dima.

Çareserkirina dijîtiyan di navbera Kuweyt û Iraqê de, li bajarê Suudî Erebistanê Cîdde, bê encamek bidawî hatin. Di dema qutbûna pêwendiyan de, Iraqê 100 hezar leşker û 300hejmar ji çekên xwe yên giran pêşberi sînorê Kuweytê bicî kiribû.

24

Bi kurtasî pirsa Kendavê
di çapemeniya Swêdê de

'2ê Tebaxê

Ber bi sibehê ve, saet 02. 00 dan de hêzên leşkerî yên Iraqê ketin axa Kuweytê. Şêxê Kuweytê El-Sabah revî Suudî Erebistanê. YN civînek taybetî zû bidarxist û biryara 660 - an wergirt. Li gor wê, divê Iraq di zutirin dem de ji Kuweytê hêzên xwe vekşînê û pêwendî yên, ku rê ya çareseriyê ji dijîtiyan re peyda bike, destpêbikin. DYA, Fransa û Brîtanya pêwendiyên xwe bi Iraqê re rawestandin û hemû hebûna maddî ya Iraqê û Kuweytê li welatên xwe cemidandin.

'3ê Tehaxê

Lîga Ereban dagîrkirina Kuweytê protesto kir. Gelek welatên Rojava û Japonya hebûnên maddî yên îraqê û Kuweytê cemidandin.

'4ê Tebaxê
Li Kuweytê bi destên Bexdayê hukimetek leşkerî hate damezrandin.
'6ê Tebaxê
YN biryara embargoya aborî û leşkerî li hemberê îraqê girt. Alîkariya insanî, derman û xwarin dervî biryara 661 - an dimînin. Kuba û Yemen di Konseya Ewletî de li gel biryarê dengên xwe ne dan.
'7ê Tebaxê
Li ser daxwaza Qralê Suudî Erebistanê Fahd,
25
hêzên leşkerî yên DYA ji bo bicîbûnê tên Suudiyê, nêzîkî sînorên Kuweytê.
'8ê Tebaxê
Tevayiya Kuweytê di destê îraqê de ye. Leşkerên Suudî Erebistanê nêzîkê sînorên Kuweytê tên bicîkirin. Di Xelîc de hêzên deryayî yên DYA, Fransa, Brîtanya û Yekîtiya Sovyetê hene.
'9ê Tebaxê
Dagîrkirina Kuweytê ji bal Iraqê ve bêqanûnî hate diyarkirin - ev biryara Konseya Ewleyî bi yekdengî hate qebûl kirin û hejmara 662 - an cîhgirt. îraqê daxuyanî da,ku heger êrîş peşberê bên kirin, dê çekê kîmyewî bikar bîne. îraqê derketina welatîyên rojava ji Bexdayê qedexe kir.
lO'ê Tebaxê
Lîga Ereban a ku li Kahîreyê kombû, daxwaza

derketina hêzên leşkerî yên îraqê ji Kuweytê kir.
Her weha biryar hate dan, ku hêzek leşkerî ya
Ereban bê rekirinî Xelîc. Saddam şerekî ku di nav
îraqê û hêzên din de derkeve binav kir - cîhad!
'12ê Tebaxê
Saddam merc a derketina xwe ji Kuweytê diyarkir,
dibêje, ku ew dikare ji Kuweytê derkeve, lê
îsraîl jî pêwiste ji axa dagîrkirî derkeve. DYA û
îsraîl ev pêşniyara îraqê qebûl nekirin.
'15ê Tebaxê
îraq û îran, imzayên xwe avêtin ser peymana lihevhatinê,
piştî şerê 8 - salan. Li gor wê, îraqê

hemû daxwazên îranê bi cîh anîn.
'17ê Tebaxê
îraqê daxuyanî da, ku welatîyên rojava yên ku li
hemberê Bexdayê negatîv û êrîşkar bin wên U
îraqê di bin çavan de bimînin. Her wekî dî, ewan
dê li ciyên stratejîk ên leşkerî bên bicîkirin.
'18ê Tebaxê
YN, biryara 664 girt. Li gor wê, Bexda pêwist e
izna derketina bîyaniyên li wir bide. Konseya
Ewletîyê ev biryar bi yekdengî girt.
'25ê Tebaxê
YN, biryara 665 wergirt. Li gor wê, ji bo ku embargoya
aborî hemberê îraqê encamên xwe bide,
dê tedbîrên hişk bêne girtin.
'27ê Tebaxê

îraqê emir da hêzên xwe yên deryayî, ku biya
biryarên YN nekin. DYA ji 3/2 karmendên sefareta
îraqê ji welatê xwe derxist. Danîmarkayê jî
gemiyek xwe birêkir Kendava îranê.
'9ê ilonê
Li paytextê Fînlanda Helsînkî, Serokê DYA G.
Bush û Serokê Yekîtiya Sovyet M. Gorbaçov
hevdu dîtin. Naveroka cîvina wan krîza
Kendavê bû. Di daxuyaniya hevdîtina xwe de,
wan diyarkirin, ku pêwist e îraq ji Kuweytê derkeve.
Çend hêzên Kurd ji Bush û Gorbaçov re vê
nameya jêrîn birêkirin".
27
NAMEYA VEKIRl
Ji bo civîna bilind di navbera Serokê DYA G. BUSH
U Serokê DYYS M. GORBAÇOV de li Helsînkî
09llon 1990
Serokên hêja!
îro hûn ji bo çareyekê peyda bikin, ji bo kriza Rojhilata
Navîn a ku bi wergirtina Kuweytê ji alî dîktatorîya
Saddam û rejîma BAAS a Iraqê ve destpêkir, bi hêja)
Gorbaçov / Bush) re hevdû dîbînin.
Ekselans, wekî hûn dizanin, neteweyê Kurd ê ku 25
milyon e, di nav sînorên çar dewletan de, ji hemû mafên
xwe yên neteweyî, demokratî bêpar dijî. Kurd ên Iraqê yên
ku beşek ji gelê me ne, H hember serkirdayetiyên dewleta
Iraqê di proseseke dîrokî de her ji bo mafên xwe yên demokratî,
neteweyî û mirovahî şer da ne. Dîsa her wekî

hûn agahdar in, partiya BAAS a Iraqê û serkirdayetiya wê ya dîktator, pêşberê gelê Kurd şerek ne - mirovatî û dijwar dajo. Nimûneyên wan ên dawî, bikaranîna gazên kîmyewî di heremên Helepçe Adar 1988 û Badînan-Tebaxl988-deye.

Serkirdayetiya Iraqê ya îro, ne bi tenê di nav welat de, li hember Kurdan, di sala 1980'yî de li hember îranê û di meha derbasbûyî de li hemberê Kuweytê bi êrîşên xwe, carek din nîşan da, ku hêzek astenge, ji bo aştî û ewletiya heremê.

Girêdayê van tiştên jorin, biryargirtina embargoya aborî, ji bal Konseya Ewletî ya Rêxistina Yêkîtiya Neteweyan, bi xwe Iraqê ji karakterê wê yê êrîşkar bi dûr nexist.

Serokatiya dîktator a Saddam, li hember mafên gelê Ereb ê Iraqê jî astengek e. Serkirdayetiya dîktator hemû mafên demokrat ên gelê Ereb bi dawî aniye.

Serokên hêja, di vê civîna we de, ya ku babet heye ji bo peydakirina aştîyeke berdewamî û ewletiya Rojhilata

28

Navîn, wekî nûnerên gelê Kurd em daxwazin, ku hûn ê ji bo aştîyeke rastane û berdewamî, wek alîyekî herî girîng pirsa neteweyî, demokrat û meşrû ya neteweyê Kurd jî bînin rojeva xwe.

Em wekî alî, ji we serokên hêja,

-Di hemû pêngavên navneteweyî de, ku wekî naverok pirsa Rojhilata Navîn heye, nûnerîtiya neteweyê Kurd jî wekî alîyekî girîng bînin ber çavan.

-Daxwazên meşrû yên Eniya Kurdistana Iraqê, ya ku berpirsîyariya

neteweyê Kurd dike li Kurdistana Iraqê divê
berçav bêne girtin û di sewiya navneteweyî de bêne parastin.
Hêviya me ev e, ku hûn ji bo vê yekê dê pêngavên
pêwist bavêjin.
Bi hêviya ku hûn di civîna xwe ya bilind de, li ser Rojhilata
Navîn û mafê neteweyê me, bigihin biryarên hêja, em
serfiraziya karê we dixwazin!
Gniya Kuidistana Iraqê
Tevgera Rizgariya Kurdistan (TEVGER(
Partiya Demokrat a Kurdistan (PDK - T(
Partiya Rizgariya Kurdistan (RIZGARl(
Tevgera Sosyalîst a Kurdistanê (TSK(
Rizgarîxwazên Netewî yên Kurdistanê (RNK(
Partiya Demokrat a Kurd li Suriyê (El - Partî(
Partiya Demokral a Pêşverû ya Kurdên li Suriyê
Partî Karkerî Kurdistan (KÎP(
29
'13ê ilonê
YN, tenê ji bo birêkirina xwarin û pêwistiyên
yekem ên ku dibe ji îraqê re bêne rêkirin
organîze bike, komîteyek çavdêr damezrand.
Kuba û Yemen li dijê vê biryarê di Konseya
Ewleyî de dengên xwe bi kar anîn.
'16ê ilonê
YN, biryara 667 girt. Li gor vê biryarê, dan û
standina îraqê li hemberê sefaretên li Kuweytê
hate protesto kirin. Wekî din jî hate nîşandan,
ku divê îraq rê bide bîyaniyan û li sefaretan ji

Bexdayê derkevin.
'24ê ilonê
YN, biryara 669 girt. Li gor wê, 18 welatên ku ji
ber embargoya îi hemberê îraqê ketine krîza
aborî, aîîkariya aborî ji wan re bê kirin. Biryar bi
tevayiya dengan di Konseya Ewleyî ya YN de
hate qebûî kirin. Bermîîeke petroîê derkete 38
doîaran.
'25ê ilonê
YN, biryara 670 girt. Li gor dê embargo û
kirinên îi hemberê îraqê divê bêne ferehkirin.
Firîna baîafiran ji Bexda û ji bo Bexdayê têne qedexekirin.
Kuba îi hemberê biryarê dengê xwe da.
'9ê Çiriya Pêştn
Saddam Huseyn tehdîda, ku dikarin êrîşan
30
bibin ser îsraîî kir.
'23ê Çiriya Pêşîn
Ji baî îraqê ve hate diyarkirin, ku 330 weîatiyên
Fransa dikarin ji îraqê derkevin. Ji dervî wê 33
weîatiyên Brîtanya bi serokwezîrê kevn ê
Brîtanya Edward Heath re ji Iraqê derketin.
'25ê Çiriya Pêşîn
Amerîka biryara birêkirina 100 hezar îeşkerên
din ji bo Suudî Erebistanê girt. Hejmara îeşkerên
Hêzên Hevkar îi herêmê gihişt 350 hezaran.
31
Li ser krîza Kendavê çend dîtinên şexsî

Me di derxeka krîza Kendavê de 11 Stockholm û Uppsalayê ji çend kurdan " li gor te divê rawêja) tewrê) Kurdan di derheqê krîza Kendavê de çawa be " ?pirsî. Bersivên wan kesên Kurd em bi kurtayî li jêr pêşkeş dikin.

Aram Bêwey (31 salî, ji Kurdistana başûr: (

Berî her tiştî divê Kurd xebata yekîtiyek fereh bikin. Ne bi tenê li perçeyekê Kurdistanê, lê li seranserê Kurdistanê. Eger em li bend û hêviya Ereban bin, wê çaxê encama mafê Kurd nîne. Divê xebata Kurdan ji bo Kurd û Kurdistanê bê.

Rizgar Soranî (29 salî, ji Kurdistana başûr: (

Ji bo Kurdan îro firset e, Kurdan ji şerê di navbera Iraq ê Iranê de ku 8 salan domkir, tiştek bi dest nexist. Diyar e, ku bi daxwaz û xebata otonomiyê Kurd hîç nagehên mafên xwe yên neteweyî. Siyaseta rêxistinên Kurd divê di nav Kurd û serkirdayetiyê de rast û demokratîk be. Divê îro Kurd ji bo rûxandina Saddam hêzên xwe bikin yek.

Perî Azadî (35 salî, ji Kiurdistana başûr: (

Kurdên me ta îro pişt bi îran û îmaman girêdabûn. Ji aliyekî din ve jî dixwestin guft û goyan li gel Saddam pêk bînin. Ew rawêj û siyaseteke çewt e. Pişt bi Ereb, Faris û Tirkan nayê girêdan. Divê Kurd bi hêz û destê xwe mafê xwe bigrin. Pêwiste, Kurd mafê xwe yê çarenûs diyar bike. Divê di nav Kurdan de wekhevî û demokratî hebe. Kara û karyera şexsî tune be; kolektîfî hebe. Divê Kurd yek deng û yek dest bin. îro xebat ji bo rûxandina Saddam be.

Xorto (36 salî, ji Kurdistana bakûr: (
Di mesela Kuweytê de hinek dibêjin Saddam û rejîma xwe li dij împeryalîzmê ne. Ne weha ye.
Saddam û rejîma xwe li dij împeryalîzmê nînin. Ji aliyê din ve, wek masmediya Rojava birê dide Amerîka ê hevalbendên wê jî ne demokratîxwaz in. Ev şerê wan ne li dij dîktatoran e. Leca kûçikan li ser laşê kerê ye. Ew jî petrol e. Ez wek kurdekî, ji bo xelkê Iraq û Kuweytê nikarim bêjim "li cem kûçikê xwe cîh bigrin". Ez dikarim bêjim, kûçikê xwe ji desthilatiyê bixînin. Li gor min çare şerê hundirîn e.
Leca me Kurdan ne leca laş e. Û cîhê me ne li cem kûçikê mezin û ne jî li cem ê biçûk e. Leca me do çi bû, îro jî ew e. Prensîbên me do çi bûn, divê îro jî ew bin. Armanca Kurdistaneke yekgirtî, serbixwe û demokratîk e. Ev prensîp ji bo vî şerê ha jî derbas dibe.
Rêber (36 salî: (
Saddamê faşîst rûyê xwe yê reş hîn reştir kir. Ew dixwaze Helepçeyeke din pêk bîne. Lê, vê carê ez ne bawerim, ku ev bûyer bi hesanî wek olana ku Saddam amade kiribê pêk bê. Lê, ji bo me Kurdan du tiştên girîng hene. Yek ji wan ketina rejîma Iraq a Saddam e. Ya din jî, ji me Kurdan re, di roja îro de polîtîkayeke durust divê. Ku li gor armanc û daxwaza Kurdan ji vê bûyerê fêde bê dîtin.
E. Cotkar:
Iro Kurd belav in. Berî her tiştî pêwist e, ku Kurd yek bin. Kurd bi eqil û çavên xwe li doz û bûyerê binêrin. Qîr û cîr li ser petrolê ye. Ev dewletên ku îro li dij Saddam

dertên, wan bi xwe Saddam kirin Saddam. Her kes ji bo kara xwe dike. Ji bi kara Kurdan jî çi pêwîst e û divê Kurd bikin.

33

Merzîye Ferîqî - Razazî (ji Kurdistana Rojhilat: (

Li gor baweriya min divê Kurd ne li alî Saddam û ne jî li alî Amerîka bin. Ji ber kirin û xebatên wan ji bo me vekirî û ronahî ye. Kurd îro ne xwedî bi hêz û qudreteke mezin in, ku bikaribin li heremê tesîr bikin û guhertinan pêk bînin. îro hêz û qudret bi kar tê, ne qise. Ji bo hîç alîyekê divê Kurd xwe ne kin mertal û berpal.

Zagros (28 salî, ji Kiurdistana Rojava: (

Kurd wek rêxistin divê bi hev re bin. Niha kes alîkariya Kurdan nake, ne Sovyet û jî Amerîka û ne yên din. Kîjan dewlet alîkariya Kurdan bike baş e. Niha rewşa pêşmerge gelek qels e. Ku Saddam here û li Kurdistana Başûr dewletekê çê bikin, Sovyet û Amerîka wê dewletê qebûl bikin, wê demê rejîma Iraqê qels dibe. Bi kurtayî, ku Saddam bikeve, Kurd dê xurtir bibin.

Bavê Azad (35 salî, ji Lubnanê: (

Li heremê çiqas xirabî çêbe, herem çiqas li hevdu bikeve û çiqas xirabî bibe, bi Saddam dibe, bi baweriya min dê hewqas jî ji Kurdan re baş bibe. Û çiqas Kurd ber bi hev bên, bîr û eniyan çêbikin, dê ji neteweyê me re baş bibe. îro gelek îmkanên Bereyê (Cephe) Kurdistana Iraqê hene. Dimîne ew şerê di navbera Iraqê û yên din de. Ez bawer dikim, ku dê di nêzîk de tiştekî çêbibe, ne dûr e. Xwedê bi me re bê!

Mustafa (35 salî, ji Kurdistana Bakûr: (
Bi rastî ez dixwazim şer derkeve. Dema ku qetlîama Helepçe tê bîra min, ez dixwazim li Iraqê kevir li ser kevir nemîne.
34
Tîmûrê Xelîl (40 salî, rojnamevanê Riya Teze, ji Yekîtiya Sovyetê - Erîvanê: (
ratina min ev e, ku divê Kurd tevê vî şeri nebin. Çima?
Ji ber ku ew ne şerê me ye. Ne şerê neteweyê Kurd e. Şerê dewletan e. Divê pirsa şer bê safîkirin. Ji ber ku şerê ku çêbe, dê li ser erdê Kurdistanê be. Hem li Kurdistana Tirkiyê û hem jî li Kurdistana Iraqê. Lê tiştek heye ; kî gunehkar e, divê bê cezakirin. Saddam û dorberên wî gunehkar in, divê bên cezakirin. Yê ku avêtiye ser Kuweytê ne gelê Iraqê ye, rêjîma wê ye. Ew rejîm divê bê hilweşandin. Rejîmeke faşîst e. MîUetê me ji zû ve bi vê yekê dizanîbû.
Huseyîn Seîdî (41 salî, ji Kurdistana Rojhilat: (
Rewşa îro ji bo gelê Kurd rewşeke baş e. Divê hemû Kurd bê îhtîlafên siyasî beşdarê helwesteke (tewreke(weha bibin, ku tesîrê li ser Amerîka û dewletên din bikin û wan îqna bikin, ku ew qebûl bikin ji bo dabeşkirina Iraqê û pêkanîna Kurdistaneke serbixwe.
'29ê Çiriya Pêşîn
Biryara 674 a YN, bi awakî hişk Iraq protesto kir, ku hem welatiyên bîyanî nahêle ji Iraqê derkevin û wekî dîl wan di destên xwe de digre. Daxwazî hate kirin, da hemû welatiyên bîyanî bikaribin ji Iraqê derkevin. Kuba û Yemen li dij biryarê raya xwe dan.

S'ê Çiriya Paşîn
Serokdewlet ê DYA G. Bush ferman a birêkirina 150 hezar leşkerên din ji bo Suudî Erebistanê da.
35
SELİM CEWHER re hevpeyvînek
)Endamê Polît Buro ya Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê(
"BEREY KURDISTANÊ JI BO ÇARESERKIRINA PIRSA KURD PROGRAMA XWE HEYE"
Pirs : Li pey êrîşa Iraqê îi dij Kuweytê hûn qi sedeman dibînin?
Selîm Cewher : Di destpêkê de, ez dixwazim spasîyên xwe bo we nîşan bidim, ku we îmkan dan me, ku em dîtina xwe bighînin raya gştî ya Kurd. Êrîşa Saddam li dij Kuweytê ne berhema pêgavake demî ye. Ew encama sîyaseta Saddam bi tevayî ye.
Şerê 8 salan bi îranê re, Iraq xiste tengasiyeke mezin - di warê aborî, siyasî û dîplomasî de. Eger em li êrîşa Kuweyt temaşe bikin, pêwîst e em deh salên dawîn ên Iraqê jî bînin ber çavan.
- 1Li gor statîstîkên hatine belavkirin, piştî şerê bi îranê re, dewleta Iraqê nêzîkî 100 - milyar dolar deyndar derket. Ev deynêkî felekî ye. Her berê şer jî, 24 milyar dolar deynê Iraqê hebû. Bi vî awayî mirov dikare bîne ber çavan, ku rewşa aborî ya Iraqê çawa bûye.
- 2Her di dema şerê 8 salan de, di rewşa hundirî ya Iraqê de - fîrma, kargeh û şîrketan xisarên bi milyaran dîtin. Di sala 1985 -an de aborîzanên aborî yên Ewropayê nîşan dan, ku 50 sal pêwîst e, ji bo ku Iraq li rewşa xwe ya aborî ya

berê vegere. Ew di rewşeke weha tengasî de bû, ku alternatîv li pêşî yê nedihat dîtin. Ji welatên Ereb tenê Kuweyt 12milyar dolar deyn dabû Iraqê. Herweha welatên Xelîç bi giştî 35 - milyar dolar deyn dabûn. Gava şer di navbera Iraq û îranê de rawesta, rejîma Bexda nikarîbû tenê faîzên deynên xwe bide, yên ku di salê de digihiştin 11-12
36
milyar dolar. Petrola Iraqê bi xwe têrî vegerandina van faîzan nedikir.

- 3Wek tê zanîn, milyonek leşkerên îraqê hene. Rewşa aborî jî wek hat gotin, weha xerab bû. Eger ev ordî hatibane belavkirin an jî kêmkirin, divabû ku ji wan kesan re kar bête dîtin an bêne xwedîkirin. Encamên şerê 8 salan jî li ber çavan in. 500 - hezar leşkerên Iraqê di vî şerî de hatin kuştin an brîndarkirin.

- 4Kurdistan çandinîyek gelek bi xêr hebû. Lê, Saddam 4000gundên Kurdistanê wêran kirin. Her weha bi dehan bajarên Kurdan ên ku rûniştvanên wan digihan 50 - 60 hezari (wekî Pêcivîn, Çwarde, Qeredax, Mêrga Sor, Gelale, Şêrwan û hwd.) wekî heremên qedexekirî îlan kirin. Nêzîkî yek mîlyon Kurd ji cîhên xwe hatin belavkirin û li jêriya Iraqê û li ordîgehan hatin bicîhkirin.

Jiyana insanan li gelek heremên welatê me hate bêîmkan kirin. Bi vî awayî, xêra ku ji van cîh an dihat, bi awakî " hesanî " hate birîn.

- 5Rewşa siyasî li Iraqê, piştî 8 salên şer dijwartir bû. Bi taybetî pirsa Kurd piştî van salan bi awakî girantir hate pêşberî rejîma Iraqê. Hate dîtin ku Saddam bi ti awayî ji bo

anîna jiyanek demokrat amade nî ne. Problemên 22 salan
ên ku BAAS bi xwe re anî, di encamê de dijwartir hatin
rojevê.
Iraq ji jiyanek weha derbas dibû. Sedemek taybetî ya êrîşa
Saddam li hemberî Kuweytê ev bû, ku gelê Iraqê bi problemên
din bê mijûlkirin. Ji ber ku di berdewama şer de,
rewşa xirab ku gel tê de bû, bikeve xalak dawî. Pirseke din
a girîng ev e, ku daxwaza - stratejî ya Saddam bi serokatî
ya mîUî ya Ereban ve girêdayî ye. Saddam vê yekê difikire,
ku bi destekî du tan bileyzîne.
Berjewendiyên Ewropa Rojava, Amerîka û dinya ya
mayî bi heremê ve gelekî girêdayne. Saddam hesabê van
tiştan tenikî dike. Petrola Iraqê û Kuweytê bi hev re wekî
37
rezerv (li gor Enstîtu ya Ereb li Londrayê - di sala 1985 - an
de) a Iraqê 101 sal û ya Kuweytê jî 207 sal e. Xwedîbûna
dewlemendiyek weha yek ji sedemên temehiya Saddam
bûye.
Aliyekî din jî yê girîng heye, her dîktator di pêvajokê de
her çiqas di zihn û zordariya xwe de pêş bikeve, şaşîteyek a
dîrokî ya mezin dike. Hîtler di nava Ahnanya de her çend
pêş ketibû, gava êrîşê Polonya kir, dawiya xwe di wê rojê
de bi destên xwe danî.
Pirs ; Hûn biryarên Rêxistina Yêkîtiya Neteweyan û
hatina îeşkeran bo heremê çawa dinînin, geîo ev kirin têr
dikin?
Selîm Cewher : Di 22 salên ku rejîm di dest de ye,
Saddam çi kiribe, jê re hatiye gotin - Aferîn ! Brîtanya û

Amerîka bi plan ji '63 - an ve ev rejîm anî. Piştî 1968 - an ku Saddam ji pişt perdê ve serokatiya vê rejîmê girtiye dest xwe, her zilm û zordari, ta'de û teror li gel serokatiya wî bi hevdu re meşîn e. Berî rewşa 1985 - an (perestroyka (Bexda gelek mecalên manewrayê hebûn. Tenê di navbera - 1987 - 1982an Yekîtiya Sovyet bi bûhayê 10 milyar dolar çek firotine Iraqê (Borîs Yonanov kovara" Sovyetîska Kultura). Ji dervî wê Iraqê çek ji hemû dinyayê heye. Di dema şerê li dijî îranê de, welatên Ewropa Rojava ji bo Bexdayê sîstemeke çekdari ya bilind ava kirin. Van hemû tiştan Saddam bi hêz kir û niha dinya belayê vî tiştî dikşînê.

Hatine leşkeran, belê em bibêjin ên derve bi biryarên RYN çêbûye. Hebûna wan di heremê de, sedema wê ya herî mezin Saddam e. Biryarên RYN heye ku welatek bikeve xetarê de, dikare alîkariya leşkeri bixwaze. Em h gel biryarên RYN in û em dibêjin ew pêwîste bêne naskirin. Saddam dixwaze bide nîşankirin, ku şer di navbera Iraq û

Amerîkayê de ye. Ev propaganda bi awakî xurt di nav Iraqê de tê kirin. Ew dixwaze vê propagandayê bi taybetî di nav welatên Ereban de û her weha li dervî wan jî bike. Daxwazeke din a Saddam ew e, ku krîz her berdewam be, di nav welatên Ewropa Rojava, Amerîka û welatên din de opozîsyonek bête sazkirin.

Pirs : Li gor rewşa nû, dîtin û xebata we di çi qonaxî de ye?

Selîm Cewher : Xebata Partiya Demokrat a Kurdistan

berî wergirtina Kuweytê jî diyar bû. Em wekî Partiyeke xelkekî bindest û dagîrkirî, her dem li ser bingeha peymana 11Adar a 1970 - yî daxwazên xwe diyar kiriye. Ta ku mîlletê me negihije wan mafên xwe, xebat û têkoşîna me dê her berdewam be. Piştî rawestana şerê Iraq û îranê, her wekî Kek Mesud Barzanî nîşan dabû - paşî bikaranîna çekên kîmyewî, pêwîst bû em metodên xwe yên leşkerî biguherin. Me dest bi çalakiyên partîzanî kir.

Pêşmergeyên me bi hêzeke giran di tevayiya Kurdistana Iraqê de mewcud e. Ji destpêka 1990 -î de wan çalakiyên leşkerî yên serkeftî pêk anîn. îro piştî rewşa dagîrkirina Kuweytê, me ev çalakî hinekî kêm kirin. Baş tê zanîn di destê vî dijminê zordar de, çekên kîmyewî û bîyolojîk ên modem hene. Pêşmerge bi grubên biçûk (15-20 nefer) digerin, ku karibin li dijî êrîşên kîmyewî xwe biparêzin.

Pirs : Eger rejîma Saddam bête ruxandin, îi gor we aîternatîf çi ye?

Selîm Cewher : Saddam Huseyn şansê xwe yê dawîn jî hebû, ji bo çareserkirina krîzê, heta civîna Helsînkîyê bikar ne anî. Saddam guh neda û nade pêşniyarên RYN û welatên Ereban. Rê yên bi aştî çareserkirina krîzê gelekî

kêm bûn. Altematîv a yekem piştî mxandina Saddam, tebîî ye ku opozîsyona Iraqê ye. Ew ji girêdayê wê ye, bê krîz çawa dê çareser bibe. Problem îro ji opozîsyona Iraqê meztir e, lê dawiya wê jî ew e, kî were ser hukim pêwîst e opozîsyonê û bi taybetî jî Berey Kurdistanê bîne ber çavan. Berey Kurdistan programa xwe ji bo çareserkirina pirsa

Kurd heye û ew bingeha dan û standina me bi her rejîmê
re ye - pêkanîna Peyman a ll'ê Adara 1970 bi awakî rastane.
Cemal Batun û A. Tîgrîs
'28ê Çiriya Paşîn
YN biryara 677, a ku Iraqê bi guharandina şeklê
mniştvanî ya Kuweytê sucdar dike, bi yekdengî girt.
*29ê Çiriya Paşîn
YN biryara 678 girt. Biryar bikaranîna hemû tedbîran
pêşberê Iraqê, ji bo derxistina hêzên Iraqê ji Kuweytê serbest
dike. Li gor biryarê, metodên leşkerî jî, ji bo vê
armancê dibe, ku bêne bikaranîn. Heta 15'ê çileyê paşîn,
ku Iraq axa Kuweytê neberdê û venegerê sînorên xwe, dê
bi hêza leşkerî bê derxistin. Kuba û Yemen li dij biryarê
dengê xwe dan û Çîn bêdeng ma.
'30ê Çiriya Paşîn
Iraqê bersiva ultîmatom a YN bi awakî hişk da. Hemwelatiyên
Swêdê jî, dê bikaribin ji Iraqê derkevin. Serokdewletê
DYA, Bush got, ku "amadeye Wezîrê Derve J. Baker
birêbike Bexdayê û herweha wezîrê derve yê Iraqê T. Azîz
dawetî Waşîngtonê dike".
40
l'ê Çileyê Pêşîn
Iraqê diyarkir, ku pêşniyara G. Bush qebûl dike. Lê,
daxwaz a naveroka hevdîtinê ne tenê, li ser pirsa Kuweyt
bê, herweha pirsa FOistîn jî bi giranî bigirtina destan.
'6ê Çileyê Pêşîn
Saddam Huseyn ferman da, ku hemû biyanî dikarin ji
îraqê derkevin.

'12ê Çileyê Pêşîn
DYA, Iraq protesto kir, ji ber nexwestina wan bi
hêvdîtina wêzîrê derve yê Amerîka J. Baker re.
'15ê Çileyê Pêşîn
Iraqê daxuyanî da, ku wêzîrê derve T. Azîz dê nikaribe di
' 17ê çilêya pêşîn de biçê Waşîngtonê.
'9ê Çilêya Paşîn
Wêzîrên derve yên DYA J. Baker û yê îraqê T. Azîz li Cenewreyê
hevdu dîtin. Hevdîtina, ku 6 saetan dom kir, tû
encama çareserkirina pirsan bi riya aştî neda. T. Azîz
hemû pêşnîyariyan red kir.
'13ê Çilêya Paşîn
Sekreterê giştî yê YN Perez De Cuêllar , li Bexdayê
Saddam dît.
Tû encamek bidest ne ket.
41
'14ê Çilêya Paşîn
Parlamentoya Iraqê biryar da, ku tewrê Saddam bi ne
tav^ dan U ser pirsa Kuweytê raste.
17ê Çileya Paşîn
Axaftin, munaqeşe û spekulasyonên li ser dê şer
derkevê yan na, qediyan. Di saet 00. 30 de şer destpêkir. Ji
wî demî ve li ser Bexdayê bombe tên barandin. Balafirên
êrîş ên hêzên Hevkar ji navendiya xwe li Suudî Erebistanê,
yek li pey yekê difirin armancên xwe bi taybetî di
nav Bexdayê de, di hilweşînin. Şer bi navê " Operasyona
Bahoza Çolê " ji alî DYA ve hate binavkirin.
Heta niha hêzên Hevkar tenê bi balafiran şer dikin. Ji

şerê erdê re dem nehatiye. Bi destpêkirina şer re, rewşa Rojhilata Navîn a piştî şer destpêkir werê rojevê. Di daxuyaniya xwe ji bo danezanên ragihandinê re, Serokê DYA G. Bush diyarkir, ku " dê li Rojhilata Navîn sîstemeke nû bikeve jîyanê."

Heta niha, tû agahdarî li ser roja yekem a şer çawa derbas dibe, nehatiye belavkirin. Iraq bi çi awayî xwe li dij êrîşên balafirên ên hêzên Hevkar diparêze, tiştek nayê zanîn. Tê gotin, ku çend balafirên Fransayê birîn girtine. Agahdariyên herî fereh ji heremê, ji bal CNN (Televizyoneke DYA, ya ku di sermaye şexsî de ye) ve tên belavkirin. Nûçevanên CNN ji Bexdayê, çawa bombardiman li ser bajêr pêk tê, ji otêla " El - Reşîd " U Bexdayê didin. Gava li ser Bexdayê bombardiman dom dikin, li DYA jî xwepêşandanên li dijî şer pêk tên.

Herweha tê diyarkirin, ku bassên leşkerî, hêzên hewa û kargehên kîmyewî yên îraqê xesarek gelek mezin, ji êrîşên hêzên Hevkar dîtine. Qelsbûna xweparastina Iraqê jî, bi vî tiştî ve tê girêdan. Li gor agahdariyên ji DYA ve hatine belavkirin, ji % 80 êrîşan îsabetê armanca xwe kirin e. Dîsa li

gor van daxuyaniyan 1 - balafira DYA û 1 - balafira Brîtanî hafine xistin. Leşkerekî amerîkayî jî hatiye kuştin. Di hevpeyvineke bi pîlotekî amerîkayî re hate kirin, wî diyarkir, ku ji Bexdayê bersiva wan bi parastinek çekdar a fereh hatiye dan. Wî got, ku ji erdê ve gelek gule hatine berdan. Radyoya Bexdayê di nûçeyên xwe de gotiye, ku 55 belafirên dijmin hatine xistin. Her çend gelek saet ji destpêka

şer derbas jî bûne, heta niha ji her du aUyan ve jî, tû agahdariyên fereh û bi îspat nehatine belav kirin.

43

ŞERDESTPEKIR

Şeva ku 16'ê Çileya Paşîn bi 17 'an ve girêdide, di saet 00. 30de, piştî li hêvîman a nêzîkî şeş mehan, ku Saddam hêzên xwe yên leşkerî ji Kuweytê vekşîne û negihandina ti encaman bi rêyên aştiyê, li gor destûr a RYN ji 29'ê Çiriya Paşînê ya sala 1990'î, hêzên Hevkar êrîş birin ser navendiyên leşkerî yên Iraqê. Her weha cîhên leşkerî yên girîng li Kuweytê, ku çekên nûjen li wan hatiye bicîhkirin jî bûn hedefa balafirên DYA û hêzên Hevkar.

Li gor nûçeyên, ku ji alî ajansên dinyayê ve hatin belavkirin, h hember sîstem û mekanîzma çekdari û leşkeri ya Iraqê, êrîşên herî dijwar ên belafirên eskerî di tevayiya dîrokê de pêk hatin. Zêdetirî 2000 caran bi êrîşên belafiran, Hevkaran di roja yekem a şer de " Operasyona Çolê " dan destpêkirin. Rojnamevanên Amerîkayî yên ku di vê rojê de, ji otêl a " EI - Reşîd " li Bexdayê nûçeyên xwe gihandin dinyayê, rewş weha dianîn zimên : " Bi sedan balafiran Bexda bombardiman dikirin. Me ji otêla xwe, gelek cîh ên hatin hilweşandin û dişewitîn, dîtin. Du posta yên nêzîkî otêla me bûn, bi tevayî hafin hilweşandin. Ti tişt ji wan nema ! " Pîlotên ku di êrîşên li ser Bexdayê de cîh girtibûn, bersivên rojnamevanan weha didan : "Bexda wekî çam (dar) a sersalê, me vêhist."

Ji aUyê din ve, sansurek fereh U ser rewşa şer, ji aliyê Bexda û Waşîngtonê ve hate danîn. Rojnamevan û

ajansên dinyayê vî tiştî wekî " tarîkirina agahdariyê"
binav dikin. Girêdayî wê, ji Iraqê, Amerîkayê û welatên
Hevkar nûçeyên resmî yên U ser şer bi awakî gelekî cuda
û bi ferq tên belavkirin. Li gor daxuyaniya rejîma Iraqê,
tenê di roja yekem a şer de 55 balafirên Amerîka, Brîtanya
û hêzên din hatine xistin û di encamên êrîşan de 23 kesên
siwîl jiyana xwe windakirin e, 66 kes jî brîndar bûn e. Li
gor daxuyaniya Hêzên Hevkar - DYA û Brîtanya her yekî
44
belafirek windakirin e. Her weha hate diyarkirin, ku di
roja yekem a şer de 100 roket U hember Iraqê hatine teqandin
û ji sedî 80 êrîş biser ketin e û erkê xwe bi cîh anîn e.
Bi kurtayî dawiya roja yekem a şer hate nîşandan, ku Operasyon
a Hevkaran bi serketî tewa biiye. Heta dîtinek weha
hate belavkirin, ku Iraq li ber Hêzên Hevkar nikare serê
xwe hilde. Lê, wekî tê zanîn û Bexdayê ji zû ve dabû xuyakirin,
ku Iraq xwediyê yek milyon leşker e, xwediyê çekên
kîmyewî, bîyolojîk û roketên modern e. Ji bo, ku piştgiriya
welatên Ereb û musilmanan bigre, Iraq ji destpêkê xwest,
ku îsraîlê jî bikşîne nav şer. Ji ber vê armancê bi avêtina
rokêtên SCUD ser îsraîlê Bexdayê diyarkir, ku tehdîda wê
ne vala ye.
Weha, di roja duwem a şer de, Iraq berî ku bersiva hêzên
Hevkar bide, roketên SCUD ber bi xaka îsraîlê ve teqandin.
Bajarên Tel Avîv û Hayfa bûn hedefên 3 roketan. Di her
du bajaran de tehrîbatên maU yên mezin pêkhatin û U gor
agahdariya dewleta îsraîlê 12 kesên siwîl di van êrîşan de
brîndar bûn. Iraqê her weha roketek avêt pêşberê navendiya

leşkerî ya Hevkaran li bajarê Dehranê yê Siudî Erebistan.
Lê, berî ku roket bikeve, ji aUyê roket a " Patriot " a
Amerîkayê ve, li ezman hate îmhakirin. Êrîş a Iraqê U dijî
îsraîl bû sedem, ku bi hezarên êrîşên belafiran li dij Iraqê
pêk bên ji bo ku bikaribin roketên Iraqê yên heyî bi tevayî
bimxênin. Her weha piştî êrîşa Iraqê hemberî îsraîlê
hêviyên hêzên Hevkar, ku hêza Iraqê ya êrîşê ji dorê derxistiye
vemirandin. Bi vî awayî wan destpêkirin, ku ne
tenê qala serfiraziyên xwe bikin, lê lêkolînên ferehtir li ser
hêza Iraqê bikin.
Ji aliyê din ve, paşî rêkirina rokêtan cara duwem ser
xaka îsraîlê, baweriya Iraqê ku dê hêzên Hevkaran
tevlîhev bike û welatên Ereb, bi taybetî jî Suriye û Misrê ji
nav van dûr bixê, vala derketin. Hem Şamê û hem jî
Qahîreyê êrîşên Iraqê hemberî îsraîlê protesto kirin. Wan
45
daxuyanî belavkir, ku " planên sextekar ên Saddam, ku
wan ji hêzên Hevkar dûr bixe, dê bi ser nekevin"!
Rêberatiya hêzên Hevkar da nîşandan, ku êrîşên balafiran
li hemberê Iraqê dê heta nîvê meha sibatê dom bikin.
Ji roja duwem a şer, pirsek a ku Tevger a rizgarîxwaz a neteweyê
Kurd herî zêde mijul dike jî hate rohnîkirin.
TIRKiYE Ji DIKEVE NAV ŞER
Parlamento yaTirkiyê bi erêkirina ji aliyê MecUsa
Wezîran jî, biryar a bikaranîna bassên (ûs) NATO ji alî
hêzên Hevkar ve qebûl kir. Li gor vê biryarê, balafirên
welatên NATO ' yê dê bikaribin ji hemû bassên xwe li
Tirkiyê û bakûrê Kurdistanê bi rêkevin û êrîşan bibin ser

Iraqê. Hêzên leşkerî yên Tirkiyê zêdetirî 150. 000 esker, qomando
û hêzên taybetî (çevik kuvvet) li ser sînorê Bakur
û Başûrê Kurdistanê ji hev diqetîn e, bicîh kirin. Li gor
nûçeyên belavbûyî, li wir her weha hêzên leşkerî yên
NATO' yê jî hatine bi cîh kirin.
Tirsa bikaranîna çekên kîmyewî ji aliyê Iraqê ve li
hemberê bakurê Kurdistanê, windabûnên pêşîn jî U gel
xwe anîn. Li sê malan li Diyarbekrê ji malbatekê 3 kes, li
Qurtalanê ji malbatekê 6 kes û li gundekî Nisêbînê ji malbatekê
- 3kes, piştî pêçana derî û penceran bi naylonê, ji
ber bê hewa mayinê fetisîn. Wekî din, nûçeyên ji bakurê
Kurdistanê tên, xuyadikin, ku ji niha ve xelk di nav telaşê
de ye, ku şer li ser axa Kurdistanê jî belav bibe.
Her weha hate dîyar kirin, ku kargehên kîmyewî,
bîyolojîk û nukleer yên Iraqê, yên ku li başûrê Kurdistan
in xesarên mezin ji êrîşên belafirên Hêzên Hevkaran dîtin
46
e. Li vir cîhê wê ye, ku bête nîşandan, ku hêzên
pêşmergeyên Bereyê Kurdistana Iraqê, heta niha, ji roja
destpêkirina şer, bi hêzên leşkeri yên Iraqê re neketina tû
şer an tû daxuyanî jî, ji aUyê Bereyê Kurdistana Iraqê ve, li
ser bûyerên li Iraqê nehatine belav kirin.
Çend rojên şer çi dan dîyar kirin?
Tiştê ku heta niha xuya ye ev e : Taktîk a Iraqê, ku dixwaze
bi kişandina îsraîlê nav şer Suriye û Misrê ji hêzên
Hevkar dûr bixe, bi ser neket. Ji çend fîşekan pê ve li ser
erdê jî şer demeket. Diyar e daxwaz a Hevkaran berdewama
şer di vê demê de êrîşên belafiran e û heta niha taktîka

wan, ku şer hîn ji ezman dom bike bi ser dikeve.
Tirsa terorîzmê li hemû dinyayê, bi taybetî jî li DYA û welatên Rojava Ewropa, bi xwe re gelek amadebûnên parastinê anîn. Lê, nûçeya encamê êrîşek terorîstî, cara yekemîn ji Fîlîpînê hat. Du Iraqî yên ku xwestin e, bombeyekê deynin bîblîotek a Amerîkayê li Manîla hatin kifşkirin. Yek ji wan hate kuştin û yek jî, bi birindarî hate girtin.
Ji bo aştiyê li hemû derên dinyayê xwepêşandan tên kirin. Lê, anketên U DYA hatine kirin, diyar dikin, ku piraniya gel ê Amerika û Brîtanyayê piştgiriya serokên xwe Bush û Major dikin. Yekîtiya Sowyetê poşmaniya xwe ji firoştin a roketên SCUD ji bo Iraqê dîyar kir. 1000 kesên Bangladeşî xwestin li gel Saddam şerê Amerîkayê û hêzên Hevkaran bikin.
Di rojên pêşya me de, dê çi tişt bibin, niha ne diyar e...
Em Kurd ji sedsalan ve li hêviya tiştan ma ne, em hinekî

din li hêviyê bimînin, dê çi çêbibe ? Her kes di van rojên dawîn de, vê baweriyê tîne zimên, ku li Rojhilata Navîn piştî şer dê dema aştiyê were... Di gotinek me Kurdan de dibêje : " Dawiya şer xêr e ! " Bi hêviyek weha...
'20ê Çileyê Paşîn
Êrîşên Hêzên Hevkar bi balafiran dijî Bexdayê û heremên din ên stratejîk, ên ku di wan ciyan de bassên leşkerî hene domdikin. Hemû ciyên, ku bassên Iraqê yên eskerî tê hene, dibin hedefa bombardimanan. Herweha, ji bo ku îsraîl jî bikeve nav şer, da şer biguhere, bike şerekî

Erep û îsraîlî, îraq destpêkir raketên Scud ber bi erdên îsraîlê ve biteqînê. DYA û hêzên din ên Hevkar bi hemû awayî kar dikin, ku Israîl bersiva van êrîşan ne de. Di danezanên ragihandinên cîhanî de hate diyarkirin, ku ji bassên NATO li başurê Tirkiyê (bakurê Kurdistanê) ji încîrlîkê belafir bi rê dikevin û armancên leşkerî li bakûrê Iraqê (başûrê Kurdistan) bombardiman dikin. Bi peyvên din, ji Tirkiyê ve eniya duwem pêşberê Iraqê destpêbû, ku bê bikaranîn. Niha pirseke herî girîng jî ev e - gelo dê Saddam bersiva Tirkiyê bide?

Heta niha hejmara êrişên balafiran U hemberê Iraqê 4000 derbaskirin.

EJîtina, ku dê şer bi destpêkirina xwe re biqede, diyare şaş derket. Li gor daxuyaniya Pentagonê ya resmî hate belavkirin, heta niha tenê 11 belafirên Iraqê hatine texrîpkirin.

Li ser hemû êrîşên U dijî tê bikaranîn jî, teqandina raketan dijî Israîlê, diyar dike, ku hemû hêza Saddam nehatiye hilweşandin, gelek U ser piyan jî heye.

Şer hîn peyayî erdê nebûye. Hêzên Hevkar bi hemû hêzên xwe ji ezmanan ve lêdixin û Iraq jî dixwaze şer bikşêne erdê. Di dawiya şevê de ajansên Brîtanî agahdarî

belavkirin, ku heta niha tenê 11 belafirên Iraqê hatine îmhakirin. Li aliyê din, li gor daxuyaniyên resmî yên Brîtanya 50 belafirên Iraqî ji dewrê hatine derxistin. Her weha tê gotin, ku gelek alet û makîneyên şer Iraqê hi - landine bin erdê. Eger ev agahdarî rastbin, tê vê manê, ku Iraqê gelek tiştên xwe ji êrîşên Hevkaran parastin e. Bi

peyveke din, şer dom dike.
Bi bombardimanên li ser axa Iraqê, Kurdên ku nêzîkê sînor dijin derbasî " sînorên " Tirkiyê dibin. Saddam bir yara êrîşê da hêzên xwe yên leşkerî, ku li hemberê van Kurdan şer bikin.
Konseya Wezaretan a Tirkiyê, ji bo ku meqerên li Rojava û Bakûrê Rojava Tirkiyê jî bikevin dewrê, mafê erêkirinê û bikaranînê da hukimetê. Muxalefeta Tirkiyê hemberê vê biryarê derdikeve. Herweha muxalefet li dije, ku NATO û Hêzên Hevkar bikaribin bassên, li ser "axa" Tirkiyê bikar bînin. Li hember ketina şer a Tirkiyê, muxalefet li gelek hereman xwepêşandanan pêk têne û nerazîbûna xwe bi biryarên hukimeta Ankarê re dîyar dike. Tê zanîn, ku sedem a qîr ên muxalefet û hukimeta Tirkiyê jî bi taybetî girêdayî pirsa Kurd e. Li gor muxalefetê bi derketina li hemberê şer û dûrman a ji şer ji bo berjewendiya yekîtiya Tirkiyê baştir e. Li gor hukimetê aktîv cî girtin bi Hevkaran re dikare, di rojên hatî de zêdetir berjewendiyan ji Tirkiyê re bêne. Bi vî awayî, eger piştî şer pirsa Kurd were masê jî em ê bibin aUyek li ser masê û em ê bikarin li pêşiyê bibin asteng - raman dike , hukimet a Tirkiyê. Her du alî jî, ji bo armancekê xwe nêzîkê bûyerên îro dikin. Armanca wan yek e, lê metodên hukimet û muxalefetê cuda ne.
Berî roj biqede, aktîvîtetên Iraqê di şer de fereh bûn. Fuzeyên Saddam vê carê ber bi Suudî Erebistanê ve hatin teqandin. Ku serê fuzeyên Scud U Riyad û Dehranê ketin, bi jehrê kîmyewî ve ne dagirtiye, heta niha nehatiye dîyar

kirin. Weke tê zanîn meqer a navendî ya Hêzên Hevkar li Dehranê ye.
Tanqên Hevlcaran ber bi sînorên Kuweytê ve diçin.
Diyar e, Hêzên Hevkar bi şerê balafiran ve dibe, ku êrîşên erdî jî destpê bikin bibin ser Iraqê. Çekên herî niijen di şer de tên bikar anîn. Fuze yên Patrîot di van rojan de ji aUyê her kesî ve tên axaftin. Ev fuze berî ku fuzeyek hatî rêkirin bikeve, di ezmanan de wê diteqîne. Niha piştî çend raketên Scud li ser erda Israîl ketin, DYA çend fuzeyên Patrîot tevî spesialîstan rêkir Tel Awîv ê. Ev fuze dê îsraîlê ji êrişên raketên Iraqî yan biparêzin.
Hate diyarkirin, ku raketên Iraqê yên ku hatibûn teqandin ber bi Suudî Erebistanê ve, berî bikevin ji aU raketên patrîot ve li ezmanan hafine îmhakirin.
'21ê Çileyê Paşîn
Tirkiye hewl dide, ku belafirgeha Batmanê jî bixe dewrê. Gelek mniştvanên bajêr li derdora balafirgehê di saetên dawî de tevgerek dijwar a leşkerî dîfine. Rojnamevanên, ku li ser van agahdariyan çûne heremê dibêjin, li dora belafirgehê fuze hatine bicî kirin.
Wezirê dervê yê kevn ê DYA, yê binav û deng Henry Kissinger dîyar kir, ku " armanca bingehîn a DYA şikandina hêza leşkeri ya Iraqê ye. DYA daxwaze, ku wekheviyek leşkeri di nav dewletên Erep ên dostên DYA de û Iraqê de pêk bêne. Divê Iraq ne jî bêhêz be. Hezek e , ku yek karê kontrol bike bê. Şaşîtî ya DYA ya herî mezin di şerê heşt salan a Iraq û îranê de, hêzkirina îraqê bû. Ji aU

pisporên siyasî ve tê gofin, ku Serokdewletê DYA George Bush jî, vê armancê diparêze.
Di ekranên televizyonên dinyayê de Hêzên Hevkar daxwazên xwe yên avakirina demokrasiyek bingehîn a fereh tînin ziman. Dibêjin, ku "mafên mirovî pêwist e
50
bêne parastin, sîstemek a adaletê bê danîn." Lê, tiştên ku Kissinger dane diyarkirin, zêdetir nêzîkî aqil e.
Daxuyaniyên Saddam bi daxwazên olî ve tên neqşkirin.
Di ekranan de her suretên Saddam ên ji televizyona Bexdayê ve tên belavkirin, tên nîşandan. Saddam her limêj dike, dua ji Xwedê dike. Hemû dinyayê ji dervî xwe û îraqê , bi şeytanî, bê îman û xwînxwar binav dike. (!) Dumtiya her du aUyên di şer de bi awakî vekiri tê kirin.
Ji bo ku wê bidin qebûlkirin jî, her du alî hemû îmkanên di destên xwe de dixin jiyanê. Danezanên ragihandinê bi hemû awayî ji Saddam an ji Hêzên Hevkar tên bi kar anîn.
Saddam dibêje, ku "ji bo adaletê, îslamê û Filistînê şer dikim".
Di şerê heşt salan de Saddam bi alîkariya van hêzên, ku îro bi şeytan û bê îman binav dike, şer kir. Bi çekên jehrî li hember welatekî islamî û bi şeriatê tê îdarekirin îran şer da û bi sedhezarên musUmanan bi van çekan hatin qetlkirin. îro Saddam dibêje, ez ji bo îslamê şer dikim.
Bi dehên salan e, dewleta Iraqê a faşîst di bin serokatiya Saddam de, hemû neinsanetî û bêadaletî li hember netewê Kurd bikar anîn. îro dibêje - ez ji bo adaletê şer

dikim.
Ne tenê îraq, hemû welatên din ên ereban ji bo berjewendiyên xwe pirsa Filistînê bikar tênin. Saddam, dewletek Ereban, Kuweyt dagirkir, gava Dinyayê ev tişt qebûl nekir, dibêje - ez ji bo FUistînê şer dikim.
Saddam dixwaze bi hîs û daxwaziyên dUan bileyze.
Li aliyê din Hêzên Hevkar, ji bo sîstemek nû şer dikin. Sîstemek demokrat û insanî. Lê, wekî di axaftinên Kissinger de jî xuya dike, armanc tiştekî din e. Parastina berjewendiyên xwe di heremê de ye. Lê, ew dibêjin "em ji bo mafên mirovî, demokrasî û rizgariya Kuweytê şer dikin".
Êrîşên bi balafiran ên hêzên Hevkar tevayiya rojê berde-

wam kirin. Li ser bersiva Iraqê agahdarî nîne. Lê, di warê psîkolojîk de Iraq derbasê êrîşekê bû. Pîlotên Hevkaran ên ku ji bal Iraqê ve hatine dîl kirin, ji televizyona Bexdayê ve hatin nîşandan. Wan " poşmaniya xwe " anîn zimên. Gotin, ku şaşîtiyeke mezin bûye, ku êrîş birin ser, welatê "aştîxwaz " ê Iraqê. Herweha Bexda da diyarkirin, ku dê van pîlotan li ciyên stratejîk ên eskerî, yên ku dibin hedefa êrîşan bên bicî kirin. Ev kirin a Iraqê xuya ye tesirek xurt li raya giştî ya Amerîkayê kir. Serokdewletê DYA Bush daxuyanî da, ku "ev kirina Iraqê h dij hemû peymanên navnetewî yên li ser şer re." Xwest, ku Iraq U gor peymana Cenewreyê li dîl an meyzêne. Ev kirin dê tû caran êrîşên me hemberê Iraqê narawestînin - diyarkir.
Hemû welatên di şer de ne û bi şer re pêwendiya wan hene, sansurek fereh danîne ser danezanên ragihandinê û

enformasyonên ji herema Kendavê. Ev 4 rojên, ku derbasbûne
û di dîroka mirovatiyê de, êrîşên herî dijwar ên
balafiran e, çi dibe - baş nayê zanîn. Li ser hejmar a
kuştiyan, brîndaran, tû hejmar nehatiye belavkirin. Balafirên
ku hatine xistin çendin, ciyên hatine bombardimankirin
U kudê ne, nayê zanîn, an agahdariyên gelek cuda
tên belavkirin.
'22ê Çileyê Paşîn
Iraqê destpêkir petrolên Kuweytê bişewtîne. Hêzên
Hevkar destpêkirin bajarê Basrayê bombardiman bikin.
Wek tê zanîn navendiya leşkerî ya Iraqê li Basrayê
hatibûye bicî kirin. Serokdewletê Suriyê Hafiz El - Esed got
" :Bi derketina xwe ji Kuweytê, Saddam dikare Iraqê ji
hilweşandinê xelas bike. " Şer bi hemû dijwariya xwe
dom dike. Saddam dibêje Hevkaran " Şer bi biryara we
destpêkir, lê bi biryara me dê biqede. " Hevkar diyare dixwazin
şer rojek beri tewa bikin. Hemû kes di wê baweriyê

de ne, ku dirêjbûna şer dê xesarek mezin ji Hevkaran re
bîne.
Rola danezanên ragihandinê di roj û jiyana insanan de,
ciyek fereh digrin. Ew kesên bi siyasetê mijul jî nabin, heta
derengê şevê li ber televîzyonê temaşeyî agahdariyên ji
Xelîc dikin. Bi tesîra U ser psîkolojî û mêjiyan, di şer bi
xwe de xwedî peyvek giran dibin - danezanên ragihandinê.
Saddam îro dîsa rakêtên xwe birêkirin ser Israîlê. Li gor
agahdariya ji Israîl ve hatî belavkirin, ji rakêtên dawî yên
ku ketine, 3 - kes hatine kuştin û 74 brîndar hene.

Her rakêteke Iraqê, ku tê teqandin heyecanek mezin li gel xwe tîne. Her kes dikeve tirsa, ku ew bi jehrên kîmyewî hatine avêtin, an na. Gava dîyar dibe, ku ne kîmyewî ne, rehetiyek belav dibe.

Rewşa me Kurdan çawa ye ? Parçebûn a welatê me û hebûn a beşek ji wan di bin dagîrkirina Iraqê de, zêdeyên Ereban jî dixe hesaban de. Gava mirov pêwendiyên welatên dagîrker ên Kurdistanê jî didê ber çavan, zîncîrek fereh derdikevê xolê. Bi kurtayî Kurd siyaseta xwe li gor vê rewşê divê bikin.

Ev şerê Kendavê bi xwe Kurd anîne ber riyekê, ku îmkanên tercihê li balê gelek kêm in. Bakur û başûrê welatê me meydan a şer e, lê em nikarin dengê xwe jî zêde derxin. Ne li gel şer û ne li dij şer, em dengê xwe nikarin belavbikin. Kurd ji bo bi awakî siyasetek serbixwe dajon bên dîtin, xîretek mezin didin. Carek din pirsa Kurd ji pira Siratê derbas dibe.

'23ê Çileyê Paşîn

Li Istanbolê li dijî sê dezgehên Amerîkayê êrîşên bomban pêkhatin. Rêxistina Dev - Sol (Çepên şoreşger(xwediyê van êrîşan derket.

53

Hukimeta Israîlê di civînê de ye. Hukimet dê biryara pozisyona Israîlê pêşberê êrişên Iraqê yên rakêtan bide. Weke tê zanîn di encamê teqandina raketa Scud a dawî, ser axa Israîlê 3 - kes hatibûn kuştin û 74 kes jî brîndar bûbûn. Li bakûrê Kurdistanê tevgerek fereh a eskerî tê jiyandin. Tê gotin, ku li heremên nêzîkê tixiibên Iraqê bi hezarên

leşkeran hatine bicîh kirin.
Bêdengiya tevgera siyasî ya Kurd li başûrê Kurdistanê dom dike. Gelek insanên ji Kurdistana, ku ji aU Iraqê ve hatiye dagîrkirin, dibêjin ku sedema vî fiştî ew e, Ereb neyin eciz kirin(!)
Li başurê Kurdistanê, netewê Kurd bi salan in, şerekî çekdar ê xurt li hemberê Iraqê pêk têne. Her di vê pêvajokê de tevgera Kurd, bi çavek bratî li netewê Ereb temaşe kiriye. Di rewşa herî dijwar de jî ev dîfina xwe ne guherandiye. Wekî numune, bi çendê caran komunîstên Iraqê yên ku ji ber tehda BAAS ê reviyane li ser axa Kurdistanê qebûl kirine. Lê ev pirs jî tê mêjiyê mirov - gelo çend caran Ereban destê dostanî, bratî û hevalbendiyê dirêjî têkoşîna Kurd kirine ? Bersiv "na" ye ! Nekirine!
Di zêdeyên caran muxalefet a demokrat (!) û çep a Iraqê, piştgiriya hukimeta BAAS li hemberê têkoşîna Kurd kiriye.
Li bajarekî ji yê heri mezin ê Tirkiyê, Edana do alarm hat dan. Tirsek mezin di nav xelkê de peyda bû. Dawî diyar bû, ku tû êriş nehatine ser bajêr.
Di rapora BBC ya belavkirî de îro çend agahdariyên nû hatin xolê.
-Hêzên Hevkar heta niha zêdeyî 10 - hezar êrîş bi balafiran birine ser Iraqê.
-Ji 700 belafirên Iraqê, ku hene 30 hatine îmhakirin.
-Piraniya balafirgehên Iraqê, dikarin balafir li wan deynin û rabin.
-Di rewşa çekên kîmyewî de, Iraq dikare vî çekî di

kargehên xwe de hîn jî çêbike û di şer de jî bikar bîne.
-Rampayên, ku raketên Scud U ser wan in, gelek hîn ne hatine tesbît kirin.
-Pêwendiyên di navbera hezên leşkerî yên Iraqê di heremên cuda de hîn nehatiye birîn.
'24ê Çileyê Paşîn
Wezîrê derve yê Iraqê bi nameyek a ku birêkirî wezareta derve ya Tirkiyê, siyaseta Tirkiyê ya li hemberê Iraqê bi zimanek tuj protesto dike. Mafê, ku Tirkiyê dayî Hêzên Hevkar ku meqerê încirlikê bikar bînin, T. Azîz bi peyva-şerm binav dike û bi awayî nama xwe ji wezîrê derve yê Tirkiyê, Kurtcebe Alptemoçîn re birêkiriye. Wekî tê bihîstin îranê jî, Tirkiye li ser babet a încirlikê rexne kiriye. Berî çend rojan, nûnerîyeka îranê U ser babetê nerazîbûna xwe bi siyaset a Tirkiyê re anî zimên.
Sefaretên ji Iraqê derketî û danezanên ragihandinê diyarkirin, ku tenêbûna Iraqê li hemberê hêzên xurt ê dinê, hêza berxwedanê ya Iraqiyan geştir dike. Her çend bombardiman U ser Iraqê berdewamin, Erebên Iraqê U gel Saddam cî digrin.
Siyaseta welatên Rojava ya dirû hemberê welatên Asyayê piştgiriya ji bo Saddam xurt dike. Xwepêşandanên ji bo piştgiriya Iraqê, ji Cezayirê heta Bengladêşê dibin. BBC nûçeyek sansasyonel belavkir. Pîsporên leşkerî yên Sovyetê hîn jî alîkariyê ji bo parastina Iraqê dikin. Ev nûçeya han ji bal Sovyetê ve hate hat înkar kirin. Her weha dîsa BBC got ku, depoyên çekên giran û balafiran di

bin erdê de yên Iraqê, ji bal welatên Rojava ve hatine avakirin.
Li ser van depoyan weke hate xuyanîkirin, çiyayên
ji qumê hatine danîn. Ji wan çiyayan 5 pîstên derke- tina
ser erdê hene. Di derdora wan pîstan jî 45 depo hene. Ji bo
ku, dijmin şaş bikin di nav wan de depoyên sehte hatine
55
avakirin. Wekî tê dîtin welatên Rojava niha tiştên ku bi
destên xwe ji Iraqê re avakirine nikarin xerab bikin.
Li nêzîkê Batmanê du rakêtên Patrîot ketin. Wekî hate
diyarkirin, ew bi şaşî ketine.
Di rojekê de, li Israîlê raketên Patrîot hatin danîn. Piştî
dê êrîşên Iraqê yên bi raketên Scud hew hedefên xwe
dibînin. Tenê Scudek xwe ji Patrîotan helaskir. Ji ketina
wê li gor hinek nûçeyan 3 - kes hatine kuştin û 74 birîndar
in. Li gor hinek nûçeyên din hejmara birîndaran 100 e.
Danezanên ragihandinê bi suretên kuştî û brîndarên ji
Tel Avîvê ve hatin dagirtin. Ewmpiyan destê alîkariyê
yekser gihandin Israîlê. Serokwezîrê Elmanya Helmut
Kohl milyarek dolar aUkarî gihand Tel Avîvê. Serokdewlet
ê DYA G. Bush ev hejmar bilindkir û biryaradana
alîkariyek ji 20 milyaran girt. Ev pere hin ji wan ji bo parastin
a Israîlê, hin jî, ji bo bicîkirina cihuyên ku ji
Sovyetê hatine Israîlê dê bên herc kirin.
'25ê Çileyê Paşîn
Gava ku dinyayê bala xwe da Rojhilata Navîn, Gorbaçov
bawer dikir, ku dê pirsa Baltikum bê jibîr kirin, ev şaş
derket. Problem û pirsgirêkên di vê heremê de rewşa
Gorbaçov zêde xerabtir kir. DYA û welatên Rojava ne tenê

bi protestoyê, lê bi gavên pratîk jî nerazîbuna xwe bi Sovyetê re anîn zimên. Biryarên ku ji bo pakêtên alîkariya Sovyetê hatibûn girtin, hatin cemidandin. Wezîrê Derve yê Amerika J. Baker got, ku "hevdîtin a di navbera Bush-Gorbaçov de ku dê di sibatê de pêk bê dibê ku pêk neyê jî". Nama Tariq Azîz, ku Tirkiye bi neşermbiinê binav dikir, ji aliyê Ankarê ve hîn nehatiye bersivdan. Herweha Tirkiyê nîşan da, ku di sê rewşan de dikare bikeve Iraqê.

-Iran an Suriye ku bikevin Iraqê

-Iraq ku bikeve Tirkiyê

56

-An ku Kurd dewleta xwe ya serbixwe deynin, dê Tirkiye bikeve erdên Iraqê.

Bi peyvên din Tirkiye hazir - nazir amade bê ji bo van xalên jorîn. Di nav wan de kîjan herî zêde serê Tirkiyê diêşêne ne hevceyê gotinê ye, Kurd baş dizanin.

Li gor danezanên ragihandinê yên Ewropa Rojava, heta niha Iraq tû berxwedan li hemberê Hêzên Hevkar nedaye nîşandan. Wekî tê dîtin Iraqê tû êrişên berbiçav nebirine ser leşkerên Hevkar, nûçeyên ji heremê tên tû bûyereke weha nedaye dîyar kirin. Scudên Saddam berê xwe didin axa Israîl an Suudî Erebistanê. îro jî Scudeke ku hatiye teqandin ber bi Israîlê kesek kuştiye û 40 kes jî brîndar bûne. Nûçeyên, ku ji heremê tên xuyanî kirin, raketek ku nayê zanîn ji çi derê ve hatiye teqandin li gundekî U ser çiyayê Cudî ketiye. Gundiyan gotiye, ku her çend wan agahdariya hukimetê tê gihandiye, kes bi vê biiyerê mijul nebûye. Herweha Saddam dest bi rijandina petrola nav ava

Kendavê kir. Bi vî awayî ew dixwaze pêşketina leşkerên Hêzên Hevkar dereng bixe.
Li Beymtê piştî hevdîtin a muxalefet a Iraqê, biryarên ku li ser van gihiştine hev derketin ronahiyê. Hêzên li Beyrutê hevdîtine ji Kurdan, Şiiyan, Komunîstan û BAAS - baskê muxalif pêk tê.
-Iraq dewletek, ku ji Kurd û Ereban pêk tê be. Hemû mafên mînorîtêtan dê bêne naskirin.
-Dê hukimeteke muweqat, ku bikaribe berpirsiyariya hemû beşên civakê bike bê danîn. Piştî wê hilbejartinên demokratî dê pêk bên.
-Dê hemû mafên demokratî, di nav de serbestiya bawerî û danezanên ragihandinê jî dê bêne naskirin.
-Kesên ku di kampên nefîkirinê (surgunê) de tên girtin û hemû kesên reviyayî dervî Iraqê dê bikaribin vegerin.
5 ,1)milyon Kurd di kampên nefikirinê de li bakurê Iraqê dijin. Zêdetirî nîv milyon Kurd û Şîî jî berê şerê Iraq û
57
Iranê yê 1980 - an Iraq terk kiribûn(.
-Di welatekî serbixwe yê Iraqê de mafên Kurdan ên otonomiyê dê bêne naskirin ii di bin garantiyê de bin.
'26ê Çileyê Paşîn
Kurd, gava piştî jenosîda Helepçeyê navên kargeh û şirketên welatên Rojava belav kirin, ên ku di damezrandina kargehên çekên kîmyewî de alîkariya Iraqê kirine, kesî U wan guhdari nekir. Celal Talabanî Usteyek di destên wî de li paytextên welatên Ewropa yên Rojava digeriya û daxwaza rawestandina van şirketên ku aUkariya Sadddam

kirine dikir. Di vê listê de navên çend pîsporên leşkerî yên ku alîkariyê vî karê qirêj kirine, welatiyên Sovyetê jî hebûn.
Wezîrê derve yê Elmanya Genscher, ê ku li ser ketina rakêtên Iraqê nav Tel Avîvê hate Israîlê, digot ku "ji alîkariya şirket û kargehên Elmanyayê yên ji bo çekên kimyewî dest dane Iraqê, şerm dike. Kes û şirketên ji bo pêşvebirina teknolojiya çek alîkariya Iraqê kirine em ê bidin dadgeh ê - jî" got Genscher.
Rojnamevanê CNN ê ku ji Bexdayê nûçeyên xwe rêdike, diyarkir ku bombayeke U nêzîkê Bexdayê ket 24 kesên siwîl kuşt. Baweriya ku ji şer gelek siwîlan jiyana xwe wundakirine fereh e, lê Bexda bi xwe agahdariyên weha belav nake.
Radyoya Bexdayê daxuyaniyek balavkir, ku Iraq hêza xwe di dema girîng de dê bikar bînê.
Pentagonê daxuyanî da, ku 24 belafirên Iraqê yên siwîl ii leşkeri xwe spartine Iranê. Lê Serokdewlet ê Iranê Rafsancanî nîşan da - dê ev balafir heta dawiya şer li îranê bêne girtin.
Gelê Iranê xwepêşandanên mezin U hemberî Amerikayê dike. Xuya dike gelê îranê ji tewrê hukimeta xwe ya
58
bêalîbûnê di şer de ne raziye. îro Rafsancanî yê ku bi niinerê Hindistan re hevdu dît, "ji bo rawestandina şer divê yek serê xwe bêşênê" got.
îro li Elmanyayê li bajarê Bonnê 200 hezar kes xwepêşandanek li dij şer bi dar xistin. Herweha li Pakistanê

bi hezaran ji bo piştgiriya Saddam meş kirin. Wekî hate belavkirin, yek kes ji aUyê polîs ve hatiye kuştin.
Li Fransayê rojnama Liberation hate bombekirin. Tê gotin, sedema bombekirina rojnamê nivîsên dijî Iraqê bûne.
Li Yunanistanê jî li hember dezgehên Amerîkayê, Brîtanya û Fransayê êrîş pêk hatin.
Tirsa terorîzmê poUsên hemû welatên Ewropayê derbasî alarmê kirin. Parastinek fereh li belafirgeh û cihên stratejîk tê kirin.
Raketên Scud ên Iraqê dom dikin U ser Tel Avîv û Riyadê dikevin. Li Kendavê jî rijandina petrolê dom dike. Qirêjiya deryayê tehdîdek mezin dide ekolojiya heremê. Pîspor dibêjin, ku di her sê saetan de 45 ton petrol diçe deryayê. Ev kirina Iraqê wekî terorîzma ekolojiyê tê binavkirin. Bexda xuyanî kir, ku ew petrolê narijîne, bombardimanên Hevkaran hemberê tankêran dibe sedema vê bûyerê. Qirêjiya petrolê di deryayê 15 km. fireh û 50 km. dirêjî belav bûye. Welatên Ereb ên li ser Kendavê di bin telaşê de ne.
'27ê Çileyê Paşîn
Şer ji niha ve "feydeyên" xwe ji gelek kesan re anî. Fanêleyên bi karîkaturên Saddam li Amerîkayê wekî nanê germ têne firotin. Swisreyiyan saetên li ser suret ê raketên Saddam, pêşkeşî bazarê kirin. Pirtûka du rojnamevanên Independent a ingiUzî bi navê " Şerê Saddam " derket, pirtûkxane bi hezaran vê pirtûkê difroşin. Kargeha Ray-

theon a ku raketên Patrîot çêdike, berhema xwe çend qat zêdekir. Gelek welat di nav wan de Suudî Erebistan divê di dörê de bimînin.
Kesên bawerî bi xesara welatên rojava di vî şeri de dikirin, divê baweriya xwe biguherin. Ji ber, ku dê cihên van peran zû bên dagutin.
Di roja înê de, di civîna hukimeta Enqera de biryar a serbestkirina zimanê Kurdî li Tirkiyê ji bal wezîrê edaletê ve hat qebûl kirin. Wezîrê dewletê Mehmet Yazar ê ku li ser navê hukimetê axaft, dê pirsa weşan a telewizyonê jî bi kurdî hebe ? tû bersiv neda. Ev biryara hukimeta Enqera jiyana siyasî li Tirkiyê şoke kir. Gelo bi vê biryara xwe Tirkiye hesabê çi dike? Pirsa ku ne tenê Kurd, lê piraniya pîsporên siyasî jî dikin ev e. Tiştek, lê bê guman ji alî Enqera ve tê xwestin bê kirin, ew jî piştî şer, cihgirtina Tirkiyê di prosesa " aştiyê " li Rojhilata Navîn e. Pirsa Kurd a ku dibe werê ser masê, da tû serêşiya nedê Enqerayê, Tirkiye bi çend gavên "radîkal" dixwazê çareser bike.
îran di warê diplomasî de derbasî çalakiyên xurt bû.
Tehran amadebûna pêşkeşkirina planekî aştiyê dike.
Li bakurê Kurdistanê di heremên nêzîkê başurê Kurdistanê bombabarînên meçhul domdikin bikevin. Li gor agahdariyên ANK (Ajansa Nûçeyên Kurdistanê) heta niha 1 1 bomba di van hereman de ketine.
Li gor nûçeyên di danezanên ragihandmê de, heta niha 200hezar kesên ji şer reviyayî yên Iraqê ji ber nexweşiya iklîmê U Dîanayê 20 km. diirê " sînorê " Tirkiyê man e.
346kesên sînor derbaskirine 179 ji wan li Tatwanê, 32 kes

jî li Çolemergê hatine bicih ku-in. 20 hezar çadirên hatine danîn ji bal YN û Tirkiyê ve U hêviya "mêvanên " xwe yên Kurd û Ereb ji Iraqê ne. Li aUyê dinU kampên Kurdan ên ku ji jenosîdên Iraqê di sala 1988'an reviyabiin û hatibûn Tirkiyê, rewşa awerte (orfî îdare) hatiye bi cîh kirin. Hemû ketin û derketinên ji kampan hatine qedexe-
60
kirin. Tenê nexweşên giran izna çiina nexweşxanê digrin. Enqerayê daxuyanî da, ku li Iraqê Kurd dewletek serbi xwe deynin, dê leşkerên Tirkiyê bikevin Iraqê û rê li ber vî tiştî bigrin.
Di vê demê de jî, hukimet a Enqerayê pêşniyara qanunek nû ya ku dê zimanê kurdî serbest bike ji bo erêkirinê dide parlamentoya Tirkiyê.
Li Enqerayê îro du bomba li şirketa Air France li ya Riyên Hewayê ya Suudî Erebistan de hatin teqandin. Kes nehat kuştin an brîndar kirin.
Di rojnama " Hurriyet " de agahdariyek a ku, doktorên Tirk naxwazin li Kurdistanê karbikin hate belavkirin.
Dîsa îro, hukimet a Pakistanê 11 hezar leşker dane Hêzên Hevkar daxwaza rawestana bombardimanên giran li hemberê Iraqê kir. Diyar e, xwestina gel tesîra xwe hin û hin li hukimeta Pakistanê jî dike. Wek tê zanîn li Pakistanê bi hezarên insan her roj xwepêşandanên piştgiriyê ji bo Saddam dikin.
Bombardimanên Hêzên Hevkar hemberê leşkerên erdê yê Iraqê, ku Kuweytê di destê xwe de digrin hatin zêde kirin. Navendiya leşkerî ya Iraqê ku pêwendiya hemû

hêzên Iraqê di şer de dike, li bajarê Basrayê şev û roj di bin bombardimanên Hevkaran de ye. Agahdariyên ji Amerîkayê tên xuyanî dikin, ku ji nêzîk ve şerê erdê jî dibê ku destpêbike, ji Brîtanya jî tê gotin, ku ew dê di sibatê de destpêbike. Planên şerê erdê tê gotin di navde Iraq jî ketiye destê hemû dewletên beşdar di şerê XeUc de. Heta îro çend insanên siwîl li Iraqê jiyana xwe windakirine nayê zanîn. Telewizyona Iraqê di weşanên xwe de her tahrîbatên ji bombardimanên Hevkaran hatine kirin nîşan dide. Lê, li ser kuştinên van bombardimanan tîi hejmaran nade.

61

' 28ê Çileyê Paşîn

Nûçeya, ku zimanê kurdî li Tirkiyê dê bê serbestkirin, jiyana siyasî li Tirkiyê tevlîhev kir. Ji dîktatorê "berê" Kenan Ewren heta mirovê di sikakê de dîtina xwe U ser vê babetê tînin zimên. Serokkomarê Tirkiyê Turgut Ozal ê ku tê gotin - ji Komîteya Parastina Netewî (MilU Gûvenlik Kumlu) soza rakirina qanuna 2932'an a axaftina kurdî qedexe dike girtiye, li ser vê babetê dîtinên xwe wusa têne zimên.

"Imzêyên me di bin peymanan de heye. Ji ber vê çendê em pewiste xwe amadeyî biiyerên piştî şerê Kendavê bikin. Gava pirsa Kurd hate rojevê, divê em bêhezirî neyin girtin." (Rojnama "Hûrriyet" 27 ê çilêya paşîn(Piştî rakirina qanuna 2932-an, dê ev maf bikevin destên Kurdan.

-Dê zimanê kurdî bê serbestkirin.

-Di civîn, xwepêşandan û meşan de pankart, lewha ii afîş dê bi kurdî serbestbin.
-Çapkirina pirtûkan bi kurdî dê bê serbestkirin. Di weşandana kasêtan, sêlikan û di warê çapemenî de dê kurdî serbest be. (Rojnama "Hûrriyet" 24'ê Çilêya Paşîn(
Gava ku Dinya bi RojhUata Navîn ve mijul dibe, li gelek cihên din têkoşîn û jiyana germ dom dike. Li Afrika Başûr, li Yugoslavyayê, li welatên Baltik, li Somalyayê, ji bo daxwaz û berjewendiyên cuda şerên germ têne dan. Serokê Somalyayê Muhamed Siad Barre yê ku ji 21 salan ve ev welat îdare dikir, ji destên gerîUayên ku li hemberê wî şer dikin il payîtehta welat Mogadishu bidest xistin, bi zorê xwe xelas kir. Şerê navwelat ê ku ji sala nû ve dijwartir bii, bi reva Siad Bare ve derbasî rewşek nû bû. Piştî Hindistan û Pakistanê, musUmanan li Tirkiyê de jî dengê xwe bilind kirin. Her wekî rojnama "Hûrriyet" a ji '27ê çilêya paşîn belav dike, piştî limêja înê, bi hezarên musilman derketina sikakan. Di encamên van
62
xwepêşandanan de 1-kes hatiye kuştin, 7-kes hatine brindarkirin û 113- kes jî hatine girtin.
Musilmanên ku li Batmanê, Bîngolê û Tatwanê derketina sikakan dumşmeyên (slogan) "Bimre Amerîka" û "Bimre îsraîl" diqîrin. Di vê rojê bi xwe de li Istanbolê, Enqerayê û Kayseriyê jî bi hezarên musilman peyayî sikakan bûne û xwepêşandan pêk anîne. Musilmanên, ku gava bi hezarên zarokên Kurd ên musilman di bin bombayên kîmyewî yên Saddam de şehîd ketin, qet dengên xwe dernexistin,

niha xuya ye, gelek aktîv û çalak biine(!)
'29ê Çileyê Paşîn
Tevayiya weşanên welatên Rojava bombeya, ku do Saddam teqand diaxafin. Lê, ev bombe ne Scudeke ku kete ser axa Suudî Erebistan an îsraîlê ye. Ev bombe hevpeyvina Saddam bi rojnamevanê CNN li Bexdayê, Peter Arnold re ye. Pirsa ku tevayiya dinyayê meraq dikir, Arnold dipirsî:
P. Arnett - Gava dor hate şerê erdê hûn ê çekên kîmyewî bi kar bînin an na?
Saddam - Çi çek li hember me bêne bikaranîn, em ê weke wan bersivê bidin.
P. Arnett - Hevkaran soz dan, ku çekên kîmyewî bikar neynin. Gelo hun dixwazin bibêjin ku hun jî bikar nayênin?
Saddam - Min ne xwest ez wusa bêjim. Ez dibêjim, ku çi çek li hember me bêne bikaranîn, ên ku bi giraniyeke wekî wan bersivê bidin em ê bikar bînin.
Bi vî awayî Saddam vekirî digot ku, ew rakêtên hatine teqandinê hemberê îsraîlê û Suudî Erebistanê yên ku bi serikên kîmyewî dibe bêne lihevhatinê, dikarin xesarên gelek mezin bidin. Eger ew bikevin rewşek xetar de, dê bê ku zêde li ser bifikire van çekan bixê meydana şer . Sadam vî tiştî vekirî digot. Heta niha jî kirinên wî didin xuya

kirin, ku ew tiştên dibêje, dikê jî.
Saddam got, ez ji Kuweytê demakevim, demeket ! Her çend li hemberê wî, şerê balafiran û rakêtan yê heri dijwar

jî tê kirin, ew ji gotina xwe venegeriyaye. Got, ez ê îsraîlê bombe bikim û bombe kir ! Ez ê Suudî Erebistanê bombe bikim, got û dîsa ya xwe kir ! Gava ez bikevim rewşek dijwar ez ê petrolê bişewtînim - got Saddam û petrol jî şewitand ! Tiştên ku gotine, Saddam heta niha kiriye.

'30ê Çileyê Paşîn

Hevpeyvina Saddam ê ku tiştên dibêje dike, bi rojnamevanê CNN Peter Amett re, di ya ku got, ez dikarim çekên kîmyewî jî di şer de bikar bînim, weke bombeyekê tesîra xwe li Amerîkayê û Hêzên Hevkar kir. Bi vî awayî qisakirinên, gelo dê Saddam di şer de dest bavêje çekên kîmyewî jî qediyan. Pîsporên şer jî, ji pirsên rojnamevanan U ber kamerayên telewizyonan - bê dê Saddam çekên kîmyewî bikar bîne an na ? xelasbûn.

Bi dehan belafirên şer ên Iraqê domdikin, ku li îranê deynin. Ev babet niha di rojeva hemû danezanên ragihandinê, navendiyên leşkerî û parastinan de babeta yekem e. CIA ya bi nav jî li bersiva vê bûyerê digere. Pentagon di mijûlbûna vê pirsê de wekî, ku şer bi xwe jibîr kiriye. Li gor gelekan peymanek bi dizî di nav Iraq û îranê de heye, li gor hineke din jî van balafiran ji şer reviyane. Tê gotin, Serokkomarê îranê Rafsancanî daxuyanî daye, ku heta dawiya şer ev belafir li îranê dê girtî û di bin destên îranê de bimînin. Lê, dîsa jî şik her berdewamin. Ev belafir ên ku hejmara wan ji lOO'î zêdetire, ku dibe rojekê di şer de bêne bikaranîn, pirseke kûr xistiye serê Hevkaran.

Özal di warê "piştgiriya" Kurdan de gavak din avêt. Di

rojnameyên Tirkan de bi tîpên mezin, mirov vê nûçeya
64
balkêş dixwêne - " Di bin garantoriya Tirkiyê, îran û Iraqê de bere dewletek federal di navbera Ereb, Kurd û Tirkan de bê danîn." Wekî xwediyê "zarokek sêwî" derkeve, diyare Tirkiye dixwaze "xwediyê " me derkeve.
Li Qesra Spî ya Waşîngtonê, wezîrên derve yên Amerîkayê û Sovyetê daxuyanî dan, ku Iraq hêzên xwe ji Kuweytê vekşîne, ji bo çareserkirina Pirsa Filistînê çi ji destên wan were dê bikin.
Herweha li gelek civînan, polemîk û nivîsên di weşanan de, li ser guharandinên di herema Rojhilata Navîn de navên Kurdan jî destpêkir bê rojevê. Gelek pîsporên siyasî di axaftinên xwe de dîyar dikin, ku U Rojhilata Navîn ne tenê pirsa Filistîn herweha Pirsa Kurd jî heye û ew jî divê bê çareserkirin.
Çavkaniyên Kurd ji başûrê Kurdistan diyardikin, ku di nav Tevgera Kurd li ser rawestana koçkirinan û çareserkirina Pirsa Kurd de lihevdukirinek hatiye pêk anîn. Bê çareserkirina Pirsa Kurd li Rojhilata Navîn tû caran aştî nayê - daxuyaniyên wusa ji başurê Kurdistan ve digihên dinyayê.
Saddam dixwaze berê şer bide rewşek wusa, ku şer di navbera MusiUnan û Gawuran de ye. Ji bo rûyek " rastiyê "jî bide vê raman a xwe, dixwaze îsraîlê bikşêne nav şer. Li ser jî dixwaze îran a ku 8 salan şer pê re kir, di şerê îslam û Gawuran de U gel xwe bibîne. Ji bo vê yekê jî gazî îranê dike, ku piştgiriya Iraqê bike. Bexda qîr dide - bajarê

şuyan li Iraqê Necef û Kerbela ji alî Hevkaran ve hatin bombardiman kirin. Bi rastî jî ev her du bajar ên ku Hazretî Elî li wir hat qetlkirin, ji bal Hevkaran ve hatin bombekirin. Herweha di nav Filihtiyê û Islamê de ji berê ve dijminatiyek dom dike û di roja me de jî di rengên cuda de her berdewam e. Lê, ev şer çend şerê îslam û Gawuran e, şikên mezin li ser hene. Berî her tiştî partiya BAAS a Saddam, dibêje ku programek sosyaUstî heye, ew

îdeolojî jî, ji bal "gawuran" ve hatiye danîn. Her çend BAAS ji wan dîtinan gelek dûre jî, lê dibêje ku ew parti yek sosyalîst e. Herweha vê partiyê bi taybetî di dema Brejnev de ji alî Sovyetê aUkariyek mezin dît. Piraniya çekên Iraqê ji Sovyetê ve dihatin. Raketên Scud bi xwe, yên ku niha herî zêde li ser wan tê axaftin ii di destên Iraqê de ne, dîsa malên Sovyetî ne. Iraq wekî dewlet bixwe berhema gawuran e. Ne ew tenê jî gelek welatên heremê, dîsa berhema gawuran e, bi taybetî jî yên IngUîziyan. Tê zanîn di nav welatên Ereban bixwe de, yên ku rizgariya xwe bi riya têkoşîn û şerê rizgariyê girtine, gelek hindik in. Di nav wan de jî navê Iraqê nîne. Iraq jî wekî Kuweytê dewletek berhema îngUîzan e.

Fanatîzma olî (ya dîn) piştî numûneya îranê di destên welatên heremê de bû aletek girîng. Lê, diyar e ew ê nikaribe Iraqê xelas bike.

Çavkaniyên Fransî nîşan dikin, ku Tirkiye daxwaza heremek otonom a Kurdan li Iraqê û Tirkiyê bête danîn û ew girêdayê Ankarê be.

Serokkomarê DYA, George Bush do daxuyanî da, ku daxwaza wan "perçekirina Iraqê nîne. Wî got, piştî şer em dixwazin Iraqekê bibînin a ku ji dewlemendiyên wê, dê welatên heremê û yên cîranê Iraqê feydê jê bibînin.
Rojnamevanên Misirê, siyaseta dewleta xwe girêdayî şer protesto kirin. Ew an di ber avayiya rojnamevanên Qahîrê de di civîna xwe ya protestoyê de, rexneya hukimeta xwe li ser pirsa sansurê û serxwebûna weşanan anîn zimên.
Serokên welatê me dixwazin tenê weşanên, ku zerarên Hevkaran ku dane xelkê siwîl ê Iraqê veşêrin, bibînin. Ew naxwazin weşanên rastiya şer binivîsin, bibînin. Wekî din niha di welatê me de U hember şer wî muxalefetek mezin hebane, lê hukimet naxwaze muxalefet li ser vê babetê hebe - gotin, rojnamevanên Misirî.
Vê şevê di navbera hêzên Iraqê yên ku sînorên Suudî
66
Erebîstanê derbaskirin û Hevkaran de şerê ku derket, 8 leşkerên Amerîkayê hatin kûştin. Vê bûyerê di navbera Hevkaran de tesîrek hişk kir.
'31ê Çileyê Paşîn
Di vê roja dawî ya mehê de, ji alî pîsporan ve tê gotin, ku di nêzîk de dê şerê erdê dest pê bike. Ketina hêzên Iraqiyan nav bajarê Kayfa, yê Suudî Erebistanê hemii kes şaş kiriye. Heta niha jî leşkerên DYA û yên Suudî nekarîbûne Iraqiyan ji Kayfa derxin.
Li Enqerayê, generalê teqawutê Hulusî Saym, li ber mala xwe hate kuştin. Li cihê bûyerê belavokek a Rêxistina Rizgariya Kurdistan hate dîtin, lê rêxistina çep a Tirkan, Dev-

Sol ev bûyer girt ser xwe.
Tê gotin, ku U bakûrê Kurdistanê tenê 8 hezar maskeyên gazê hatine belavkirin. Bi peyvên din, ku şerek kîmyewî dest pê bike, Kurd dîsa bê parastin in. Herweha ji bo gel, tû agahdarî jî li ser gazên kîmyewî nehatiye dan.
Li gor agahdariyên tên belavkirin, ji do ve Iraqê, rampayên fuzeyên xwe ber bi sînorê Tirkiyê ve jî rêkirin. Herweha Tirkiyê jî hejmara hêzên xwe yên leşkerî li ser sînora Iraqê zêdekir. Li gor çavkaniyên ji heremê her dû dewlet jî amadebûnan pêşberî hevudû ferehtir dikin. Hejmara belafirên Iraqî yên ku li Iranê dideynin, ji 200-an zêdetir bû. Lê, hîn jî ev pirsgirek nehatiye vekirin û şaşbûna Rojava dom dike. Weşan ii rojnameyan Tirkan dibêjin, ku peymanek dizî di navbera her dii dewletan de heye. Li gor wê peymanê, piştî şer herem di navbera Iraq ê îranê de dê bê par kirin. îran dê dest deyne ser Bahreyn ii Emîratên Yekbûyî yên Erebî, Iraq jî dê bibe xwediyê Kuweyt û Suudî Erebistanê.
Li ser sînorên Lubnan ii îsraîlê jî teqandina rakêtan her berdewame. Li hember raketên Katyuşa yên Filistîniyan,
67
raketên Israîliyan jî, U ser kampên FUistîniyan tên teqandin. Li gor agahdariyên cuda, heta niha di navbera 4 û 12-an de gemiyên şeri yên Iraqê hatine îmhakirin.
Di aliyên din de, di navbera pisporên siyasî, felsefî, leşkerî û olî de munaqeşeyên fereh li ser şer tênê kirin. Hin ji wan şerê îroyîn bi Şerê Cîhanê yê Duwem re tênin ber hev. Di navbera Saddam û Hîtler de li ser tiştên wek

hev radiwestin. Herweha Hevkaran bi yên wê demê re dîsa dideynin yek rêzê. Wek tê zanîn, Di Şerê Cihanê yê Duwem de Hevkaran demek dirêj wekî temaşekaran li êrîşên Hîtler li hemberê Yekîtiya Sovyet meyze kiribûn. Çawa tenê wekî temaşekaran li êrîşên Iraqê hemberê îranê û şerê 8 - salî di navbera wan de meyze kirin. Komunistî dijminê Hevkaran bû û Hîtler li dij wan şer dikir. Lê pişti demekê derket ku daxwaza Hîtler ne tenê dijmintiya komunîzmê ye, wî xwest tevayiya Ewropayê bixe bin destên xwe. Erîşan dibe ser Fransayê, ser Ingilîstanê, ser Belçîkayê, ser hemû derên Ewropa...Çawa ku piştî şerê Iraq - îranê, Bexdayê berê xwe da Kuweytê. Hîtier gava berê xwe da welatên Rojava, hingî eniyek di navbera Sovyetê û welatên Rojava de hate danîn û ku bi navê Hevkaran hate binavkirin. Hinek pispor ji vê dîtinê ve derdikevin rê û dibêjin li hember Iraqê cî girtina gelek dewletan, wekî Hevkaran gavek pêşverû ye. Yên li hember vê dîtinê jî dibêjin, na ! Sadam li hember împeryalîstan şer dike, ev şerekî dijî împeryalîzmê ye- divê mirov di gel Saddam de cî bigre.

Dîtinên cuda U ser şer ne tenê ev her dû dîtinên jorin jî. Kesên ku vî şerî - şerê Islam û Filehtiyê binav dikin, li Rojhilat û Rojava jî hene. Piraniya xwediyê vê dîtinê ji nav hêzên olî tên.

68

l'ê Sibatê

Konseya Wezîran a Tirkiyê, do piştî civînek a 4 - 5 saetan qanunên 141 ii 142 yên ku li ser sucên ramanî bûn û herweha

qanuna 163 - an a ku sucê li dij laîkiyetê bû, ji bo guharandinê biryar girt. Serberstkirina zimanê kurdî ji xwe, berê hatibii xuyanî kirin. Ev guharandinên, ku hatin pêşkeş kirin, piştî qebûlkirinê, dê li Tirkiyê mirov bikare serberst dîtinên xwe biparêze. Lê bê ku ji bo wê tehdayê bikar bîne, li ser navê hukimeta Tirkiyê Mehmet Yazar, daxuyanî da ku qanunên texdayê ceza dikin dê dom bikin bên bikaranîn.

Bi vî awayî dewlet darê tehdayê di deste xwe de her dihêle.

Bajarê biçûk ê Suudî Erebistanê Kayfa, yê ku do ji bal Iraqê ve hate girtin, U gor agahdariyên ji Hevkaran ve hatin belavkirm, bi paş ve hate girtin. Lê radyoya Bexdayê dibêje, ku Kayfa hîn di destê hêzên Iraqê de ye.

Li Cezayirê bi deh hezaran kes, dumşmayên (slogan(islamî avêtin û piştgiriya xwe ji bo Iraqê dan nîşandan. Wan xwest, ku şerê islamî U hemberê Rojava dest pê bike. Herweha îran bi Cezayir, Yemen û Fransayê re planek aştiyê amade dikin. Alîkar serokwezîrê Iraqê Sadun Hammadî jî li îranê ye û bi planê aştiyê re mijiil dibe. Lê kes ne li hêviyê ye, ku niha di navbera Hevkaran û Iraqê de tû aştî pêk bê.

Wek di rojnameyên Tirkiyê de tê nivîsandin, 8 - hezar leşkerên Amerîkayê li încirlikê hatin daxistin. Tê gotin, ku ew dê di şerê erdî hemberê Iraqê de bêne bikaranîn. Bexdayê dîsa musaadeya ketina çend rojnamevanan nav Iraqê da. Wek tê zanîn di 20 - ê çileya paşîn de Iraqê xwestibû hemû rojnamevanên biyanî ji nav sînorê wê derkevin.

Wek tê fildr kirin, daxwaza Iraqê nîşandana raya gştî, ku çawa xeUcê siwîl ê Iraqê ji şer zerar dîtiye ye.
Bi ketina rojnamevanan nav Iraqê, êrîşên Hevkaran ên
69
bi balafiran jî tên ekranên telewizyonan. Bi taybetî jî wêneyên zarokan tên ekranên telewizyonan. Doktorek ê ku digot, ku li ser navê zarokan qisa dike, wusa qisa dikir:
"Zarokên me natirsin. Gava Hevkar bomban davêjin, ew derdikevin derve. Dixwazin bibêjin, em ji bombayên we natirsin".
Bexdayê îro bi devê resmî daxuyanî da, ku hêzên wan ji Kayfayê paş vekşiyane.
Qralê Urdunê Husyn, ji bal Amerîkayê ve hate rexnekirin ku embargoya ticarî li hemberê Iraqê xera kiriye. Tê gotin, ku wî ji Iraqê petrol kiriye. Rewşa Huseyn ne baş diyar dibe. Ew ji aliyekî ve dixwaze dilê Iraqê ii Filistîniyan xweş bigre, ji aliyê din ve jî peywendiyên wî bi welatên Rojava re xurt bimînin. Lê, di vê lîstoka xwe de, dibe ku ew bi xwe di bin kevir de bimîne.
'2ê Sibatê
îro ji aliyê Federasyona Komelayên Karkerên Tirk ve li Stockholmê panelek li ser şerê Kendavê hate bidarxistin. Ji partiyên siyasî yên Tirkan ve, ji Partiya Sosyal Demokrat a Geleri (SHP) Riza YUmaz, ji Partiya Ked a Geleri (HEP(îbrahîm Aksoy, ji Partiya Riya Rast (DYP) Köksal Toptan, ji Partiya Mîllî ya Refahê (MRP) Şevket Kazan û Sekreterê Gştî yê Komelaya Mafên Mirovî rojnamevan Hasan Uysal beşdari kiribûn.

Ji Partiya Nişтiman (ANAP) her çend daweti jî ji bo wan çiiye, kes nehatibii. Axaftinên beşdaran mirov dikare, bi yek pey vê binivîse : Ji şer re na ! Ev şer şerekî bêheqê ii divê Tirkiyê nekeviyê. Di nav wan de Şevket Kazan got, ku ev şerekî di navbera dinya îslamî ii ya Filehî de ye. Cihê her musilmanekî li gel Islamiyetê ye. Her çend şaşîtiyê^ wî hebin jî Saddam biiye serokê Islamê - got Kazan. Û ev serok îro li dij siyonîzmê şer dike.

70

îro her wekî di rojnameya swêdî " Dagens Nyheter " de jî dinivîsine, Neo - Nazîstên Elmanyayê, bi hêzek ji 500 kesan dixwazin di " şerê rizgariyê " yên Ereban de hemberê hêzên super cihê xwe bigirin. Neo - nazîstek bi navê Michaek Kiihnen, ê ku navên kesên dixwaze here şer U gel Saddam dinivîse, dibêje ku Saddam berhema)eser) ku Hitler hiştiye dixwaze biqedîne.

Islamiyên fanatîk li Amerîkayê di bin serokatiya Louis Farrakhans de, daxuyanî dan, ku di gel Saddam in. Dîsa faşîstên Fransayê yê di Eniya Netewî de ne, li dij biryarên YN hemberê Iraqê protesto kirin.

Heta îro jî dihat zanîn faşîstên Ingilîztanê, pêwendiyên wan bi fanatîk Islamiyên îranê ii Libya re hebiin. Wekî numiine rêxistinek a Faşîst Eniya Netewî ya Fransayê ji Libyayê alîkariya abori digirt. Di sala 1988 - an de di rojnameya xwe " Hevkariya Nu " de wekî wêneyê qepakê resmên Kaddafî, Xumeynî ii fanatîk islamiyê ji Amerîkayê Louis Farrakhans ii di paş wan de di siyê de sembola Neo - Nazîstên IngiUstanê Heça Kelt cîh girti bii.

' 3ê Sibatê
Rojnamevanê Tirk Hasan Uysal, diyar kir ku di destên wî de îspat hene - bombayên ketine ser çiyayên Cudî yê ne bi şaşîti ketine. Li Rojhilat ii Bakiirê Rojhilata Tirkiyê de terorek fereh tê bikar anîn - got Uysal, lê çi dokumen di destê wî de hene, ne da dîyar kirin.
Iraq teqandina raketên Scud ii Hevkar jî bombardimanên xwe dom dikin.
GerîUayên Filistînî, li başiirê Lubnanê heremên ewletiyê yê di bin destê Israîlê de şer germ kirine. Israîl, Rêxistina Rizgariya Filistînê (PLO) suc dike, ku eniyek nii di şer de vekiriye. Ger wusa dombike jî got, ku dê bersiveke tiij ii dijwar bide. Yaser Arafat ev tişt qebul nekirin.
Hevkar hêzên Iraqê li Kuweytê bombardunan dUcin.
71
Rojnameya Teşrîn a ku di bin destê dewleta Suriye de, rexneyek mezin li welatên Rojava kir, ku di bin tehdîda Iraqê de alîkariyek fereh dide Israîlê.
Tirkiye ya ku sefareta xwe di Bexdayê vala kir, dixwaze Bexda jî dîplomatên xwe ji Enqerayê bikşîne.
Di şer de bi sedhezaran leşker li hemberî hev in. Bi milyonan mirov di heremên şer de dijin. Gelê Ereb ê Iraqê dibe şahidê bombardimanên herî fereh. Di weşanên Rojava de niha di manşetên rojnaman de li ser balafirên B - 52 tê nivîsandin. Wêneyên wan tên çapkirin.
Ev balafirên, ku di salên destpêka 50 - an de hatin çêkirin, bi 4 atom bombeyan ii bi firandinek ji 1 100 mîlan re hatin amadekirin. Bi peyvên din wan bi

bombeyên xwe yên atomî dikarîbiin bigihin Sovyetê. Ev belafir bi tenê di ordiya DYA de hene. Heta niha ne firotine tii dewleteke bîyanî. Modela dawî yê van balafiran B-52G ye. En di şer de jî tên bikaranîn evan in. Bomba di yek carî de tên berdan. Bombeyên tên avêtin di meydanek bi dirêjiya 1 an 1,5 km. de ii di ferehiyek ji 800 metre de diteqin. Berpirsiyarek leşkerî yên DYA, ku ne xwestiye navê xwe diyar bike, nîşan da ku 50 belafirên B - 52'an di êrîşên li hemberê Iraqê de hatine bi kar anîn. B - 52 ji meqerên leşkerî U Ingilîstanê, Diego Garcia di Okyanusa Hind de ii îspanyayê bi rê dikevin. Tê gotin jî hin ji wan ji Suudî Erebistanê ve tên rakirin. îro Pentagonê daxuyaniyek belavkir, ku yek B - 52 li ser Okyanusa Hind ketiye, 3 pîlot wenda ne ii 3 - an jî xwe xelas kiriye. Ji dervî wê, piştî teqandinên şaş xuya bii, ku Hevkaran 7 leşkerên xwe yên Amerîkayî kuştine.

Serokleşkerê Hevkaran dîyarkir, ku di roja çarşemî ya çiiyî de, 28 belafirên B - 52 di rojek de 470 ton bomba avêtine ser axa Iraqê ii hêzên Iraqê di Kuweytê de. îran, Cezayir, Yemen, Fransa, Kuba, Swêd ii 6 welatên Afrîkayê ji bo rawestandina şer çend pêşniyar amade

kirine. Niinerê Yemenê di YN de xuyanî kir, ku Hevkaran armanca xwe ya rizgariya Kuweytê ji zii ve qedandine, ew dixwazin Iraqê xerab bikin. Çend welatên Afrîkayê jî dibêjin, bere Hevkar şer rawestênin, bi vî awayî îmkanan bidin Saddam da hêzên xwe ji Kuweytê vekşîne. Gava Hevkaran leşkerên xwe ji heremê derxistin, wekî hêza

aştiyê Hêzek Ereban dikare bikeve cihên wan, wusa jî pêşniyara xwe formule dikin.
Yemen ii Kuba dixwazin, li ser şer di YN de munaqeşek vekirî bibe.
Swêd ii îran daxwaza şerrawestanê kirin.
Lê heta niha pêşniyarên ji bo rawestana şer tên kirin, hîn berhemên xwe nedane, şer ji alî her du eniyan ve jî berdewam e.
'4ê Sibatê
Wezîrê Parastinê yê DYA, dîyar kir, ku îsraîl bibe hedefa çekên kîmyewî yên Iraqê ew jî di şer de dê çekên nekonvencional bikar bîne, bi gotinê din bi bomba atomî dê bersiva Iraqê bide.
Herweha Ingilîstanê U gor rojnameya " Sunday Times" ji hêzên xwe xwest ku xwe amade bikin, çawa mirov dikare ji çekên kîmyewî xwe biparêze. Tê gotin, ku Saddam emrê bikaranîna çekên kîmyewî daye hêzên xwe.
Gava danezanên ragihandinê li ser pirsa gelo dê çekên atomî ii kîmyewî bikar bên dirawestin, gazên sinîrê li ser Iraqê destpêkirin belavbibin. Li gor agahdariyên di rojnaman de cî digrin, ew jî berhema ji çekên kîmyewî yên Iraqê ye, ku niha ji aU Hevkaran ve tên bomba;kirin.
Li Fas'ê nêzîkî 300 - hezaran ji bo piştgiriya Saddam xwepêşandanek mezin bidar xistin.
Li Pakistanê 110 kesan ji Camîat Ulema - î Pakistan, ji bo li gel Iraqê di şer cîh bigirin, daxwazî nîşandan. Lê, sefîrê îranê li Pakistanê dîyar kir, ku ew ê musaade ya der-

basbiina wan a ji axa îranê nedin.
Rewşa Iraqê ii ya heremê piştî şer ji gelek aliyan ve dixe heyecanê. Serokkomarê Tirkiyê T. Özal xwest ku li ser vê babetê Tirkiye amade ye, xwedîtiya malê ya konferansek wusa bike. Dê herweha diyarkir, ku Tirkiye pêwist e U ser masê xwedî giranî be. Got, ku divê pirsa Filistînê çareser be, pirsgirekên aborî yên heremê çareser bibin, çareseriyek ji pirsgireka av'ê re bê dîtîn. Lê, Özal ê ku xwest zimanê kurdî serbest bibe, U ser çareserkirina pirsa netewî ya Kurd tiştek negot.
'5ê Sibatê
Li Tirkiyê, berî çend rojan zimanê kurdî hate serbestkirin. Lê xuya ye vê babetê serên hukimeta Tirk xistiye sergêjiyeke mezin. Ji ber ku hîn çend roj derbasnebiine, ji Enqerayê ve niha jî daxuyanîyên qedexekirina kurdî derdikevin. Çend rojnameyên Tirkiyê, îro bersivên Wezîrê Adaletê Oltan Sungurlu çap dikin ku dibêje:
Di hemû dezgehên resmî yên Tirkiyê de , zimanek tenê tê axaftin, ew jî Tirkî ye. Di zimanê nivîsî yê şirketên şexsî de jî, ew qanunên heta îro derbas dibin. Di dadgehan de ji dervî Tirkî , zimanek din naye bikaranîn. Parastinên bi zimanên din, bi rê ya werger dê bibin. Di cihên meheîî de, mirov dê bilcare bi zimanê xwe yê zikmakî bipeyve. Di dawet û govendan de û di şahiyên heremî de, dê mirov bikare bi zimanê kurdî yan yekî din stranan bibêje. Bi wan zimanan kaset jî dibe bên dagirtin û weşandin. Di fîîman de stran bi wan zimanan dibe bên gotin".
Kesê di cihên resmî de zimanê kurdî bikar bêne, ji 3

mehan heta 2 - salan dê cezayê hepsê bibîne. Ew kes dibe memur be ii dibe hemwelatiyek basît be.
Gava mirov van tiştan dixwîne, ji xwe pirs dike - ev
74
zimanê kurdî serbest an qedexe dUdn.
Şer bi xwe re gelek îmkanên bazarê ji hin fîrmayan re vekir, gelek kes jî şansên xwe ji niha ve derxistin. Wekî numiine rojnamevanê CNN ê ku bi Saddam re hevpeyvin çêkir ii herweha ji Bexdayê niiçeyên şer dan telewizyona CNN, heta dawiya jiyana xwe dê di dewlemendiyê de bije. Bi dehên fîrmayên reklaman dixwazin wî di reklamên xwe de bi kar bînin.
îsraîlê têra xwe alîkarî ji Rojava girt. Bi milyaran dolar deynên Misirê hatin xirab kirin, bi ser de alîkariya maddî jî, jê re hate nîşandan. Tirkiye jî para xwe, ji "kirinên" xwe di şer de dibîne.
Li Urdunê fîrmayekê, di ser de suretên Saddam saet, rozet, medalyon ii hwd. pêşkeşî bazarê kirin. Wekî hate zanîn Urdunî ûi Filistînî ji bo ku fraxek bi wêneyê " serokereban "bikirin, bi saetan di dorê de dimînin.
Iraq bi her awayî xwe nêzîkî îranê dike. Do alîkar Serokwezîrê Iraqê Sadun Hammadî di dîtina xwe bi Serokkomarê îranê Rafsancanî re, dîyar kir, ku Bexda li ser pirsa tezmînatê, ji bo şerê 8 salan amadeye bi Tehranê re riine.
Di civîna xwe de, ji dervî wê Hammadî nîşan da, ku ew amade ne da Şu û Kurd jî di îdareya Iraqê de cî bigrin. Her weha wî ji Rafsancanî xwest, ku ew belafirên Iraqê ên reviyane îranê musaadeya vegera wan bê dan. Bersiva Rafsancanî

nayê zanîn, lê wî nîşan da, ku amadeye di navbera Iraqê ii Amerîkayê de li ser rawestana şer barekî hilgire.

'6ê Sibatê

Saddam, serokê Filistîniyan ê nii ye. Serokê RNF Yaser Arafat doza filistînî xiste destên Saddam de. Li ser zimanên Filistîniyan tenê Saddam heye. Filîstînî di xwepêşanan de, bi navê Intîfada Filistînî wêneyên

75

Saddam hildidin. Di ekranên telewizyonan de gava bi yekî fiUstînî re hevpeyvînek dibe, li ser zimanê wan navê Saddam diçe ii tê. Ew bi navê Saddam dikevin xewê ii bi navê wî şiyar dibin.

Serokê PLO Arafat, di axaftinên xwe yên bi rojnamevanan re xuya dike, ku Saddam brayê wan ê mezin e. Gava pirsek li ser Kurdan tê, ji bersivê direve. Lê, ya xerîb" pêşverii û şoreşgerên " dinyayê, rexne li wan nagrin, ku bi dîktatorek wusa re ketine piştgiriyê ii xwedîtiyê li yek dozê dikin.

Parlamenterê Kurd ji Mêrdînê Nurettin Yilmaz ji Partiya ANAP, parlamentoya Tirkiyê tevî lev xist. Wî ji bo parlamenterên Tirk ên ANAP'ê got:

-Berî hûn }i Asya ya Navîn werin, em îi ser vê axê dijîn, em xwediyê vê axê bûn.

Serbestkirina zimanê kurdî di nav ANAP'ê de munaqeşeyên dijwar têne xolê.

Serokê YN, Perez de Cuêllar ketiye rewşek xerab. Do piştî, ku Hevkaran kamyonên Urdunê yên siwîl, derbasî Iraqê dibin bomba kirin, wî rexne U van êrîşan kir.

îngilîstanê jî bi zimenkî hişk ew rexne kir. Londrayê got, ji cihê Cuêllar me rexne bike, divê Iraqê rexne bike. Wan rojên derbasbiiyî jî Tariq Azîz, Cuêllar wek berpirsiyarê şer nîşan da.

Wezîrê Parastinê yê DYA Dick Cheney ii Serokleşker ê DYA Colin Powel di dawiya hefteyê de diçin Suudî Erebistanê. Ji bal gelek pîsporan ve ev çiin wekî nîşana destpêka şerê erdê tê dîtin.

îro di parlamentoya Swêdê de, ji Partiya Çep (VP) Bertil Mobrink di axaftina xwe de rewşa Kurdan bi ferehî anî zimên. Wê got : " Divê Kurd wekî çavdêr di YN'de cihê xwe bigrin. Ev şer bi awakî fereh jî li ser axa Kurdan dibe. Kurd carek din di bin tehdîda çekên kîmyewî de ne. Lê, maskeyên Kurdan dijî vî çekî nînin. Li Tirkiyê di

heremên Kurdistanê de, ji karmendên Tirk re maske hatine belavkirin, lê ji bo milyonên Kurdan na! Swêd li ser vê babetê divê raweste.

' 7ê Sibatê

Bombardimanên Hevkaran pêşberê hêz ii bajarên Iraqê berdewam dikin. Hêzên Hevkaran ên deryayî jî, ji deryayê ve raketan davên hedefên Iraqê.

Pentagonê diyarkir, ku her çend ev sê hefteyan hêzên Iraqê tên bombardiman kirin jî, Muhafizên Komarê hîn hêza xwe diparêzin.

Iraq pêwendiyên xwe yên dîplomatî bi welatên, ku di Hêzên Hevkar de cî digrin re dibire. Iraq wan bi bombardimankirina hedefên siwîl sucdar dike.

Wezîrê derve yê DYA, James Baker dîyar kir, ku piştî şer dê sîstemek nii ya parastinê bête danîn.
Wezîrên Derve yê Brîtanyayê Douglas Hurd ii yê Suriyê Famk Şara li ser planeke aştiyê civînek pêk anîn.
Alîkarê Wezîr ê Derve yê Sovyetê Aleksander Belonogov ii Wezîrê Derve yê Tirkiyê Ahmet Kurtcebe Alptemoçin, ji bo rawestandina şer bi Serokkomarê îranê Rafsancanî re li Tehranê hevdu dîtin. Rojnameya Cumhuriyet nivîsî, ku li gor raporên ji DYA ketine destên wan Amerîka naxwazê Kurd serxwebûnê bigrin, lê razîye ku mafê Kurdan ên fereh ê kulturî hebin. Li gor vê raporê, Cumhuriyet dinivîse, ku Kurd nîşanên xwe yên Netewî nînin. Ew di nav kulturên dijin de xeliyane.
S'ê Sibatê
Berê 12'ê îlonê (roja înqîlaba eskerî li Tû-kiyê di 1980 de(Kurdan, pîvan a demokratbiina rewşenbirên Tirkan li ser dîtina wan ji bo Tevgera Kurd ve derbasdibe - digotin. Sal derbasbiin. Iro li Tirkiyê rexneyên ku U dijî eskeran
77
tên kirin, wekî pîvan ji bo demokratbiinê tên nîşandan. S. Demirel jî yek ji wan " qehremana " ye. Lê, gava pirs tê ser Kurdan, demokratbiina kesên weke wî diqede. Piştî ANAP ' ê bikaranîna zimanê kurdî serbestkir, Demirel peyvên wusa gotin:
"Neteweyek bi navê Kurdan nîne. Ku hun wusa hesêb bikin, hiin rê ji bo perçebiina Tirkiyê vedikin. Li ser bingeha mezheb ii nîjadan, ku veqetandin li Tirkiyê bên kirin, ev îxanet bi doza welatê me re ye".

Ev peyvên jorê, ji axaftinên Demirel di rojnameya"
Hiirriyet " a do de hatine gtrtin.
Danezanên ragihandinan li cîhanê îro biiyerên terorîstî
ji xwe re kirine semivîs. Li Swêdê nameya bombayî, Li
îngilîstanê li hember avayiya serokwezaretê êrîşa bi topa
hawanê, ya ku ji bal ÎRA ve (Ordiya Komara îrlandayê(
ve hate kirin, Li Tirkiyê li bajarê Adana kuştina leşkerekî
Amerikayî ii hwd.
Meha Ramazanê nêzîk dibe. Ev tişt, di nav Hevkaran de
welatên musilman dixe telaşê. Di vê mehê de gelek kes
bawer dike, ku Saddam êrîşek fereh a manewî bibe ser
hêzên Hevkar, bi taybeti jî welatên Ereb ii yên din ên musilman,
ku îro şerê Iraqê dikin. Ji ber vê yekê niha gelek
pispor daxuyaniya didin, ku dibe şerê erdê berê Ramazanê
destpêbike ii di demek kurt de bê qedandin.
Şerê Kendavê bi xwe re, ji bo Kurdan guhartin anîn. Ya
herî giring di nav wan de xwedîderketina berjewendiyên
neteweyî ye. Kurd hin ii hin fêrdibin, ji pencereya Kurdistanê
ve lêkolînan li ser biiyerên çêbikin.
ll'ê Sibatê
Şer berdewam e. Hevkaran daxu yanî da, ku heta tevayiya
hedefên ku dikarin ji ezman ve îmha bikin hebin, dê
balafirên wan êrîşên xwe dom bikin. Saddam jî her dibêje,
ku dawiya dawî dê serfirazî ya Iraqê be.
78
Hate dîyar kirin, ku Konferansa Navnetewî ji bo mafên
mirovî yên Kurdan di 15, 16 ii 17- ê adarê de li Stockholmê
dê bê bi dar xistin.

'12ê Sibatê
Heta niha pêşniyar ii daxwazên çend dewletan ji bo rawestandina şer ii çareserkirina pirsgirêkan bi riya aştiyê tii berhemên xwe nedane.
Ji nav welatên negirêdayî blokan 15 dewlet, ji bo amadekirina planek aştiyê li paytexta Yugoslavyayê Belgrad dicivin.
Herweha dîsa wekî pêngavek, ji bo peydakirina aştiyê, Çîn sefîrekî xwe rêdike Tirkiyê, îranê, Suriyeyê ii Yugoslavyayê.
Saddam bi awakî neyekerast (indirekt) bersiva xewlên îranê ji bo peydakirina aştiyê da ii got : "Em heta negihin serfiraziyê em ê tii pêşniyarên ji bo aştiyê qebiil nekin".
Sefîrê Gorbaçov ê taybetî diçê Bexdayê. Xuya ye Gorbaçov bi rewşa Iraqê, ku ketiyê ve nexweş e. Ew dixwaze di zutirin dem de Iraq jî Kuweytê hêzên xwe bikşîne, wekî din rewşa Iraqê dê gelek ber bi xerabiye biçe, dibêje Gorbaçov.
Niinerê Filistîniyan li Swêdê Eugene Makhlouf diyarkir, ku ew amadene bi Parastina Swêdê (SAPO) re, li ser êrîşên terorî xebatê bikin.
Her wekî Iraqê jî qebiil kir, do êrîşên Hevkaran 15 dezgehên leşkerî yên Iraqê wêran kirin. 15 hezar leşkerên Iraqê hatine kuştin.
Iraqê biryar girt, ku ciwanên 17 - salî jî bixe bin çek. Bi peyveke din, xwendevanên gimnasium jî di bin leşker ii hember Hevkaran dikevin eniya şer.
Li gor daxuyaniyên ku belav dibin, xuya dike şerê erdê

nêzîk destpê dike.
Heyecana serbestkirina zimanê kurdî li Tirkiyê hin ii

hin cihê xwe berdide gumanan. Di nav germbiina heyî di
Rojhilata Navîn de biryargirtina li ser babeteke weha,
Kurd bi fikrên cuda re tên berhev. Baweriya, ku ev leyistik
ii hîleyek Enqerayê ye zêdetir hevalbendan dibîne. Rojên
Lozanê tên bîra Kurdan. Gava îsmetê kerr çii bii hingî xwe
wekî niinerê Kurd ii Tirkan dabii nasandin. Di dawiyê de
jî felaketa ku hate serê Kurdan diyar bii. Mirov bixwaze,
nexwaze li riipelên dîroka xwe dinere, kes jî jibîr nake
serpêhatiyên wusa gelek hatine serê me Kurdan. Û em dipirsin
-gelo dîsa dîrok dubare nebe?
'13ê Sibatê
Li gor danezanên ragihandinê yên Tirkiyê, Saddam niha
jî li aştiyê digere. Alîkarê Serokwezîrê Iraqê Sadun
Hammadî piştî ku U îranê bi Rafsancanî re hevdu dît,
derbasî Urdunê ii ji wir jî derbasî Libyayê bii.
Saddam jî diyare têgihişt, ku bi ajîtasyonê mirov di şer
de bisemakeve. Gelo vêca dê pêngavên Saddam ji bo rizgariya
xwe wê têr bikin, yek nizane. Piştî hevqas biiyeran,
gelo dê Hevkar raziyê aştiyê bibin jî ne diyar e. Ji ber ku
Saddam di rewşa îro de bi Hevkaran re li ser masaye aştiyê
riinê, di çavên Ereban de wekî ji şer serfiraz derketi dê bê
dîtin.
Amadebiinên şerê erdê hin ii hin bi cî tên. Hêzên
Deryayî yên Hevkaran berên raketên xwe dane hêzên
Iraqê U Kuweytê. Girêdanên leşkerî yên Iraqê di bin bombardimanên
fereh ên Hevkaran de ne. Pir, sîstema elektronîk,
riyên erdê ii yên hasinî tên bombardiman kirin ii
ji karbiinê tên derxistin. Mirov dikare bibêje plana Hêzên

Hevkar a îzolasyona hêzên Iraqê di Kuweytê de ber bi serkeftinê ve diçe. Ji êrîşên ji hewayê ve hemberê sînorên
80
navbera Iraq ii Kuweytê jî mayinên ji bal Iraqê ve hatine danîn tên îmhakirin.
Dîtin, pêşniyar ê planên ji bo heremê piştî şer jî hêdî hêdî derdikevin ronahiyê. îngilîstan piştî şer di nav pirsên heremê yên çareserkirinê de wekî pirsa FUistîn, her weha Pirsa Kurd jî heye, dibêje. Li gor agahdariyên gihan guhên me Kurdan, Eniya Kurdistana Iraqê berê demekî bi niinerên dewleta Brîtanî re hevdu dîtibiin.
Diyare ne tenê jî Brîtanya Mezin, herweha gelek dewletên din jî li gel çareserldrina Pirsa Kurd in. Lê, bê guman dîtina welatan ji hev diguhere. Bi taybetî jî piraniya wan li gel mafên Kurdan ên mirovî ne, pirsa netewî dikeve xalên paşîn. Kes naxweze niha bi vî rengî pirsa Kurd bigre dest. Herweha welat di çareserkirina pirsê de berjewendiya xwe dide berçavan. Wek tê zanîn jî, em Kurd ji hêza ku bikaribin berjewendî ii daxwazên xwe bi dinyayê bidin erêkirin diirin. Perçebiina Kurdistanê wekî sedekî di pêşya çareserkirinek giştî, ji bo pirsa me ya neteweyî disekine.
Kurdên her perçeyî jî siyaseta perçeya, ku li ser dijin dikin. Ji siyasetek giştî ya neteweyî mixabin em gelek diir in. Pêwendiyên di nav parçan de, ku tên danîn jî, ne li ser baweriya giştî, lê li ser perçeyekî tên danîn. Zanistiya me ya netewî jî karakterek giştî nagre, dibe perçeyî.
'14ê Sibatê

îro, avayiyeke binerd a hilandinê di Bexdayê de, yên ku
ji sedî zêdetir siwîl tê hebiin, ji aliyê belafirên Hevkaran
ve hat bombardimankirin. Rojname, radyo ii telewizyonên
cîhanê vê biiyerê, wekî niiçeya yekem belav dikin.
Hevkar di daxuyaniyên xwe de dibêjin, ku ev prowakasyonek
Saddam biiye, ku di vî cihê eskerî de siwîl dagirtine
ii biiye sedema kuştina wan. Lê, dixwaze vê biiyerê

wekî propaganda hemberê Hêzên Hevkar bi kar bîne. Iraq
jî dibêje : "Fermo, bibînin Hevkar çawa siwîîan qeti
dikin".
Yên U dij şer in jî, dîyar dikin, ku ev berhemên şer in ii
ev wekî numiineke ye, çima mirov divê li hember şer raweste.
Yekîtiya Sovyet ii Gorbaçov destpêkirin xwe nêzîkî
Saddam bikin. Di nav hefteyê de sefîrê Gorbaçov, Jevgenij
Primakov ê ku çii Bexdayê, xuyanî kir, ku Saddam amade
ye bi Sovyetê re çarekê ji şer re bibîne.
Her berî jî, di 31 'ê meha berê Komîteya Navendî ya Partiya
Komunîst a Yekîtiya Sovyetê, ji bo çareyek ji şer re bê
dîtin înîsîyatîfek xurt ji Gorbaçov xwestibii.
Di rojên dawî de, di weşanên resmî yê Sovyetê de
nivîsên, ku siyaseta DYA rexne dUdn tên çapkirin. Li gor
van nivîsan DYA şer ji bo, ku bikeve heremê ii planên
xwe ji bo Rojhilata Navîn bixe jiyanê derxist.
Hsporên siyasî U vê nêzîkahiyê wekî tewrek tebîî meyze
dikin. Dostaniya Iraqê û Sovyetê rayên xwe yên kur hene
ii hîn jî ew ra nehatine birîn, dibêjin.
Herweha diyare YKSS ditu-se, ku tesîra xwe U ser Rojhilata

Navîn winda dike.
' 15ê Sibatê
Şerê, ku dihat bawerkirin dê di çend rojan de biqede,
kete roja xwe ya 28 - an.
Tariq Azîz îro diçe Moskovayê. Birêkirina Azîz ber bi
Sovyet ve bala tevayiya dinyayê kişandiya ser Kremilê.
Vegera Prûnakov ji Bexdayê bê daxuyaniyek qediya, ev jî
hevdîtina Azîz bi niinerên Sovyeti re bala mirov dikşîne.
Tenê Moskovayê nîşanda, ku ji bo aştiyê hêviyên xurttir
hene. Herweha Gorbaçov do bi Wezîrê Derve yê Kuweytê
Şêx Sabax Exmed El - Sabax re li KremUê hevdu dît.
82
Yek ji heremên herî zêde êş ji şer dîtî jî bakiirê Kurdistanê
ye. Bi taybetî di heremên ser sînoran de jiyana ticaretê
ketiye sifirê. Wek tê zanîn riya, ku Ewropa bi Rojhilata
Navîn ve girêdide ji vir derbas dibe. Miletê heremê jî
zêdeyiya sermaya xwe daniye ser bazirganiyê.
"Em amadene, ku ji Kuweytê derkevin. " Ev biryara, ku
îro ji alî Radyoya Bexdayê ve hate xwendin, tevayiya agahdari
ii niiçeyên din xistin siya xwe de. Bi vî awayî Iraqê daxuyanî
kir, ku biryara 660 - an a YN qebiil dike ii dê hêzên
xwe ji Kuweytê vekşîne. Weke tê dîtin ii tê diyarkirin, ev
pêngav wekî berhema pêwendiyên dîplomatî di navbera
YKSS ii Bexdayê de, tê girêdan. Sovyetê, ya ku bêriya
rojên xwe yên berê, yên rojên superdewletbiinê dike,
destşikestiyê Saddam jî her wekî berê di bin siya xwe de
dixwaze biparêze.
Pêwendiyên Prîmakov li Iraqê ii dawî jî daxuyaniya

Iraqê, ku dikare ji Kuweytê derkeve, bi yekcar Moskova kire navendiya herî girîng a dîplomasiyê. Wezîrên derve yek U pey yê din, li Moskovayê peya dibe. dib Moskovayê. îro wezîrê derve yê îranê hate Sovyetê, piştî wî jî wezîrên derve yên Civata Aborî ya Ewropayê tên Moskovayê. Piştî wan jî Wezîrê Derve yê Iraqê Tariq Azîz dê werê paytexta Sovyetê. Çavên dinyayê ber bi Moskovayê ve hatine zîvirandin.

Iraq di daxuyaniya ku da de, çend şertan jî anî ser masê. Ew dibêjin " Em ji Kuweyt derdikevin ", lê divê:

-Israîî ji axa Ereb a dagîrkiriye derkeve.

-Suriye ji Lubnanê derkeve.

-Deynên derve yên Iraqê bên mixandin.

-Li ser xesarên ji bombardimanên Hevkaran pêkhatine jî, divê em bên rawestan ii Iraq bê ava kirin.

An em ji Kuweytê demakevin - wusa dibêje Bexda. Bi gotinên din diyar dike, ku ji Kuweytê demakeve.

Wekî tê dîtin daxwazê Saddam, daxwazên aliyê serfiraz

ji şer in. Lê, her kes jî dibîne aliyê serfiraz di şer de ne Iraqê. Yên ku dê şertan jî, ji bo aştiyê deyne ne Iraq be. Dîsa jî ev gotinên Bexdayê, wekî êrîşek dîplomatî tê dîtin.

Gotin a Saddam, ku dibe ji Kuweytê derkevin piştî nêzîkî mehekê şer hatin zimên. Di vê demê de wekî agahdarî tên belavkirin, bi dehhezaran leşkerên Iraqê hatin kuştin, sîstema leşkerî ya Iraqê birînek mezin dît, rewşa aborî ya Iraqê kete xitimandinek mezin ii hwd.

'16ê Sibatê

îro di gelek rojnameyan de, li ser hêza leşkerî yên dewletên Rojhilata Navîn statîstik hatin weşandin. Li gor firotina çekan ji bo welatên heremê jî, di rêza yekem de Yekîtiya Sovyet tê. Sovyet herweha dewleta ku herî zêde çek firotiye Iraqê ye, bi 6 milyar ii 354 mUyon dolaran çekên Sovyetî di destê hêzên leşkerî yên Iraqê de ye. Sovyetê herweha bi biihayê 5 milyar ii 347 mUyonan çek firotiye Suriyê ii bi 2 milyar ii 230 mUyonan jî çek firotiye Obyayê.

Ji dervî wê şer îro jî bi hemii hêza xwe dom kir. Rojnameyên dinyayê wêneyên ji navendiya şer hîn jî nikarin bidm, ji ber ku hem Hevkar û hem jî Iraq , ji bo ewletiya parastina xwe nahêlin ji navendiya şer rojnamevan agahdariyan bidin. Ji ber vê yekê jî reqamên kuştina leşkeran ên Iraqî yan ên Hevkaran, tenê li ser daxuyaniyên her du hêzan tên belav kirin.

irê Sibatê

Çavên dinyayê li Moskovayê ye. Tariq Azîz îro diçe Moskovayê. Roja duşembê jî, dê bi Gorbaçov re hevdu bibînin.

Bush xuyanî kir ku dê manewrayên Iraqê bikaribin hevkariya di navbera Sovyetê ii DYA de xerab bikin.

84

Rojnameya Newyork Times dinivîse, ku li ser daxwaza Sovyetê, DYA destpêkirina şerê erdê hemberê Iraqê bi paş ve xistiye. Herweha soza domkirina hevkariya xwe jî bi DYA ii hêzên Hevkar re aniye zimên.

IS'ê Sibatê

Tariq Azîz ii Gorbaçov îro hevdu dîtin. Piştî plana aştiya Sovyetê, ji bo çareserkirina şer, xiste çenta xwe, dîsa vegera Bexdayê. Niha her kes di meraqê de ye, dê Saddam çawa bersiva Gorbaçov bide. Li ser naveroka plana Sovyetî heta niha tii agahdarî nehatine belavkirin.

Iraqê agahdariyek belavkir, ku piştî êrîşên hevkaran bi hezarên siwîlan jiyana xwe windakirine. Bi dehên hezaran jî brindar in. Herweha hate gotin, ku piştî êrîşa belafirên Brîtanyayê hemberê bajarê Iraqê li Felluce 130 insanên sivîl hatine kuştin.

'19ê Sibatê

Bush ji Qesra Spî daxuyanî da, ku planê aştiyê yê Sovyetê têr nabîne. Li gor niiçe ii agahdariyên tên belavkirin, naveroka planê wusa ye:

-Iraq bê ku tû şertan deyne divê ji Kuweytê derkeve.

-Ji bo ewietiya sînor û ya dewîeta Iraqê dive garantî bên dan.

-Dive embargoya îi dijî Iraqê rabe û tû ceza ji bo Saddam dê neyên dan.

-Dê pirsên din jî yên Rojhiîata Navîn ji bo çareserkirinê werin rojevê û bi taybetî jî Pirsa Fiîistîn.

Wekî ku hat weşandin ev xalên jorîn di planê Sovyetê de cîh girtine, mîna" Pîanê xeîaskirina Saddam" tê binav kirin.

85

Herweha li gor agahdariyên di danezanên ragihandinê de, niha pirsa Hevkaran ne tenê derxistina Iraqê ji Kuweytê ye. Ew di aUyê din de dbcwazin di herema Rojhilata

Navîn de, U gor berjewendiyên Rojava Sîstemek Nii ya Ewletiyê jî deynin. Ji bo ku ev armanc jî bi serkeve bê giiman çûna Saddam xalek heri girmg e. Saddamek ê ku li ser hukim bimîne, wekî serfû-az ji şer derketi dê bê dîtin. Ji roja Iraqê Kuweyt dagîr ku- heta îro, raya gişti ya cihanê bi waxşet, teror ii dîktatoriya Saddam tê nasandin. Li ser hemii van tiştan jî, eger Saddam dîsa rejîma Bexda di destên xwe de bigu-e, bi rastî jî, wekî serfirazî ji bo Saddam re dê bê dîtin.

Ji ber van hemii tiştan, Hevkar - bi netêrbiinê - planê Sovyetê bi nav dikin. Lê, xwe ji Sovyetê jî naxeyidînin, çawa be Sovyet heta niha li ba Hevkaran cî girtiye ii ev ji bal wan ve gelek girîng tê dîtin.

'20ê Sibatê

Dîyar e, ku Hevkar li xistina Saddam wekî xalek herî girîng mêze dikin. Ji riipelên rojname ii kovaran ve, ji mîkrofonên radyoyan ii ekranên telewizyonan ve her roj niinerek Hevkaran an DYA li ser dadkirina Saddam pişti şer dipeyivin.

Di nav propaganda xwe ya dijî Iraqê de, di telewizyonên Rojava de her roj li ser rewşa Kurdan li başûrê Kurdistanê jî gelek agahdari tên belavkirin. Hema hema her roj li ser Helepça ii qetlîamên Tebaxa 1988 - an tê axaftin. Wêneyên Helepçe ii yên jenosîda Tebaxê tên ekranên telewizyonan. Dinya sê salan pişti van qetlîaman, niha bi awayakî herî fereh U ser wan rojên reş tê agahdar kkin.

'21ê Sibatê

Gava ev rêz tên nivîsandin, Moskova li hêviya Tariq

Azîz e. Herweha hemii aliyên, ku hêviyek wan bi planê
86
Gorbaçov ve girêdaye, ku dê aştiyê bêne çavên xwe ber bi Moskovayê ve kirine. Dê çi bersiv di çantê Azîz de bê? Danezanên ragihandina fikrên cuda cuda li ser tênin xolê. Do şev Hevkaran, bi gotinên wan - ji bo cara dawî, Iraq îkaz kirin da ji Kuweytê derkeve. Niha her kes dibêje, ku Iraq ji Kuweytê demekeve, di demek herî kin de şerê erdî dê destpêbike. Li gor çavkaniyên Amerikayê di rojê de 100 aletên şer ên giran ên Iraqê tên îmhakirin. Di daxuyaniya, ku ji aliyê alîkar serokwezîrê Iraqê ve jî hate gotin, ku heta niha 20 000 Iraqî hatine kuştin ii 60 000 jî brîndar bûne.

Di daxuyaniya xwe, ya ku di Radyoya Bexdayê de do şevê hate weşandin, Saddam diyarkir, ku : "vê plana aştî qebiil nake".

Lê, di dîtina xwe bi Gorbaçov re Tariq Azîz nîşan da, ku: "Iraq amadeyê aştiyê ye ii planê Gorbaçov ji bo aştiyê jî qebul dikin".

Niha her kes vê pirsê didê xwe, gelo dijîtî di navbera Iraqiyan de derketiye an axaftina Saddam di Radyoya Bexda de pêşberê xeUcê Iraqê propagandek biiye?

Bi meraqek mezin danezanên ragihandinê ii raya giştî ya cîhanê li hêviya sibê ye, ku dê çi bersiv bêne dan ji bo raya Iraqê, ya ji bo aştiyê.

'22ê Sibatê

Di daxuyaniyên hatin belavkirin de, diyare Hevkar wekî Sovyetê ji bersiva Iraqê ne xweş in.

Li aliyê din hevdîtinên Tariq Azîz bi niinerên dewleta Sovyet re domdikin. îro jî Azîz bi Wezîrê derve yê Yekîtiya Sovyetê re hevdu dibînin. Ji planê ku Azîz aniye Moskovayê ve jî dîyare, ku Iraq şikestina xwe di şer de qebiil kiriye. Li gor vê planê, Iraq amadeye bê şert ji Kuweyt derkeve. Çareserkirina pirsa Filistînê jî wekî
87
şertekî ji ber derketina xwe ji Kuweytê dide aliyekî. Saddam ê ku pirsa Filisyînê ji bo armancên xwe demek fereh bikar anî, niha dîsa wê davêjê pişt guhên xwe. Yên ku ji piştgiriya Saddam zêde winda bikin, ji niha ve xuya ye, ku dê Filistinî bin. Iraq herweha qala derketina Israîlê ji axa dagîrkirî yan jî derketma Suriyê jî ji Lubnanê nake.

7xalên ku ji planê Iraq qebiil kirî ve hatine xuyanî kirin ev in:

- 1Iraq qebûî dike, ku bê şert ji Kuweyt derkeve.
- 2Ji Kuweytê derketin, piştî du rojan ku dê çekdanîn) ateşkes) hebe, dê dest pê bike. (Amerîka îi vê xaîê bi şik mêze dike. Ditirse, ku Iraq di van her du rojan de çekên giran û yên sivik ên Kuweytê bibe Iraqê. Ew jî naxwazin vê imîcanê bidin Saddam(
- 3Paşve kişandin ji Kuweytê dê di demek kin de biqede.

)Berî niha DYA ji bo paşvekişandinê 4 - roj ji Iraqê re naskiribûn. Herweha gotibû, ku çekên giran jî yên îi Kuweytê bihêîe. DYA naxwaze Saddam bi çekên xwe yên giran û modern bimîne. Dixwaze Iraqê bê van çekan bihêîe(.

- 4Gava ku ji 3 f 2 ê Kuweytê vekşandin pêkhat, divê

embargoya îi dijî Iraqê bê rakirin. (Amerîka dixwaze vekşandin ne bi merxeîan îê yekcar û zû bibe(.

- 5Gava tevayiya îeşkerên Iraqê ketin nav sînorên xwe de, divê her 11 biryarên YN, ku îi dijî Iraqê hatibûne girtin, rabin. (Di vê xaîê de DYA bi tevayî îi dijî vê gotina Iraqê ye. Ji ber ku eger bibe û Iraq ji Kuweytê vekişe, îê carek din bixwaze Kuweytê werbigre, hingî hemû ev biryarên YN ji nû ve divê bêne girtin. Tebîî Amerîka niha qet naxwazê pirsa rakirina biryarên YN bê rojevê(.
- 6Pştî çekdanînê, divê hemû dîî ên şer bêne serbestkirin.
- 7Paşve veksandin ji aîî welatên, ku di nav şer de cî negirtine dê bê taqîb kirin.

88

Vê sibê Gorbaçov ê ku bi telefona Sor bi Bush re peyiviye, li ser navê xwe ev her 7 - xal wekî planek aştiyê pêşkeşî Serokê DYA kiriye. Axaftina di nav wan de, ya ku 33 deqîqan dom kiriye, bê encamek hatiye tewa kirin. Bersiva Bush weha biiye : " Em spasiya we dikin. Em girîngiyeke mezin didin pêngavên Sovyetê yên ji bo aştiyê. Lê, li ser vê planê divê em bifikrin, bi welatên din re jî yên di nav hêzên Hevkar de ne li ser vê rewşê bipe yvin. Herweha gelek giiman me jî U ser vî planî hene. Paşî em ê bersivek bidm" .

Britanya jî nerazîbiina xwe bi vî planî re têne zimên, ku ew li dijî biryarên YN' e. Fransiyan heta niha dîtina xwe li ser ne dane diyarkirin. Dibêjin, piştî em bi welatên di Hêzên Hevkar de ne bipeyvin, em dikarin helwesta xwe bidin diyar kirin. Li gor niinerê Çînê di YN de, plan

hêviyekê ji bo aştiyê dide. Bi peyvên niinerê Misrê di YN de jî, plan ji bo aştiyê gavek gelek giringe. Kuba, Yemen ii Rêxistina Rizgariya Filistînê (PLO) jî, bi dilxweşiyek mezin ev plan pîroz kirin. Li gor wan, niha riya aştiyê li Kendavê dîsa hate vekirin.

Di nav welatên li dijî vî planî ne, yekem îsraîl tê. îsraU dibêje, ku heta sîstema çekdari ya Bexdayê neyê îmhakirin dê Iraq her dem astengek bingehîn li pêşya aştiyê di heremê de be. Herweha ew ê tehdîdek li ser ewletiya Israîl jî be.

Xuya ye, ku Kurd jî ji vî planê nerazî ne. Saddam heta xwedî çekên xwe yên di dest de be, dê tehdîdek pêşberê netewê Kurd be - ev jî dîtina Kurdan e. Heta Saddam neye xistin jî, dive Hevkar şerê xwe ne rawestînin. Madem li Bexda dixin, pêngava herî girîng hilweşandina rejîma Saddam e.

Hevkar heta niha bersiva dawî ya plana Gorbaçov ne dane. Tebîî ye yekser neqebiilkirina planê Gorbaçov dibe ku navbera Sovyet ii Hevkaran jî xerabike. Ji ber vê çendê

89

Rojava bi zimanek dîplomatî, bi dereng hiştina bersiva xwe nerazîbiina xwe jî bi planê re didin dîyar kirin. Di vê demê bi xwe de Hêzên Hevkar dom dikin, êrîşên dijwar bibin ser Bexda.

'23ê Sibatê

îro hate zanîn, ku di navbera 16 ii 17 - ê Sibatê de bi xwestina Enstîtuya Kurd li Parîsê, Kurd ên ku ji 15 dewletan hatme ii niinerên rêxistinên Kurd U Parisê civînek bidarxistine.

Di civîna ku du rojan domkiriye de, ji başiirê
Kurdistanê li ser navê Bereyê Kurdistana Iraqê Samî Abdurahman
ii Adnan Muftî, ji bakiirê Kurdistanê Partiya
Pêşeng a Karkerên Kurdistan (PPKK), Partiya Demokrat a
Kurdistan (PDK - T), Rizgarîxwazên Netewî yên Kurdistanê
-Baskê Sosyalîst (KUK - SE) û Rizgarîxwazên
Netewî yên Kurdistanê (KUK), ji Rojavayê başiirê Kurdistanê
Partiya Hevgirtina Gel ii ji RojhUatê Kurdistanê jî
Partiya Demokrat a Kurdistana îranê beşdarî kirin e. Herweha
ji şexsiyetên bangkirî jî, di nav de Nacî Kutiay,
îbrahim Giiçlii ii ji Kurdên Sovyetê Xidoyê Şakiro jî li
Parîsê di civînê de cî girtine. Di daxuyaniya civînê de ev
xalan cîh digirin.
-Divê Konferansek Kurd di demek herî kin de kom
bibe.
-Ji bo cî girtina nûnerîtiyek Kurd di pîatformên navnetexvî
de, divê îdareyek bi zûyî bê hiîbijartin.
-Di Kongreya Netewî de, bê ferq hemû rêxistinên Kurd
ên siyasî, demokratî û dezgehên mesîekî, herweha
şexsiyetên Kurd ên serbixwe jî bikaribin cî bigrin.
-Di pîatformên navnetewî de, Pirsa Kurd divê ne wekî
pirser mafên mirovatî, lê wekî pirsek netewî û bi gişayiya
xwe bê girtine dest.
90
-Ji bo ku potansiyeîa heyî ya fereh a Kurd îi derveyî
weîêt bi erkên xwe yên netewî baştirin bikaribe rabe, divê
dezgehên heyî bighin avaviyek navendî.
Di civînê de rêxistinên wekî Partiya Rizgariya Kurdistanê

)Rizgarî), Partiya Karkerên Kurdistan (PKK) ii Partiya Sosyalîst a Kurdistana Tirkiyê (PSKT) beşdarî nekirin. Sedemên ne amadebilna wan jî, bi tii daxuyaniyan nehatiye eşkere kirin.

Herweha îro agahdariyek din a giring li ser Kurdan hate weşandin. Li gor wê li Londrayê di navbera niinerek Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal ii Celal Talabanî de hevdîtinek hatiye kirin. Li ser naveroka civînê tiştek naye gotin ii tiştek resmî jî ne hatiye belavkirin.

Dema dawî ya ku hêzên Hevkar dane Iraqê ji bo vekşandinê ji Kuweytê îşev diqede.

'24ê Sibatê

Dema ku ji bo derketina Iraqê ji Kuweytê hatibii naskirin şevê din di kathejmar 19. 00 an de qediya. Iraq ji Kuweytê derneket.

Bi dehhezarên leşkerên Ordiya Sor a Sovyetê, yên ku li dijî Borîs Yeltsin xwepêşandanek bidarxistin, di destên wan de wêneyên mezin ên Saddam, piştgiriya xwe bi dîktatorê Bexda re anîn zimên. Yek ji wan leşkeran bi navê Nîkolay Valitov wusa digot:

-Ez îi hember şerek dinyayê yê sêyemin im, ê ku ji aiî împeryaîîstên Amerîkayê û siyonîstên îsraîîê ve destpêka wê tê danîn. Ereb û Rûs tû caran ii hember hevdu şer nekirin e. Ji ber ku dijminên me yek e.

Dijminê hevbeş (muşterek) ê ku Valitov digot, di destê

leşkerek din ê Ordiya Sor da bii Stêrka David bi peyvên din îsraU bii.

Şerê erdê yê ku hevqas U ser dihat axaftin li gor kathejmara Ewropê 02.00-an de dest pêkir. Li gor danezanên ragihandinê yên Rojava, hêzên Hevkar wekî hirmîyan leşkerên Iraqê berhev dikin. Li gor agahdariyên ku Saddam belav dike, êrîşa Hevkaran ji aliyê Iraqê ve hatiye şikestin. Serok leşkerê hêzên Hevkar Norman Schwarzkopf, ji her aliyan ve, ji erdê, ezman ii deryayê ve U Iraqê dixin ii ber bi pêş diçin.

Daxwaza Sovyetê û ya Gorbaçov, ku bibin kevokên aştiyê bi ser ne ket. Bi dilek xemgîn, niha ew li şer ii şikestina Iraqê temaşe dikin.

'25ê Sibatê

Semivîsên rojnaman, agahdariyên yekemin ên radyo ii telewizyonên cîhanê bi tevayî li ser destpêkiruia şerê erdê ne. Niiçeyên din wekî agahdarî ii înformasyonên biçiik rê digrin.

Wezîrên derve ii yên parastinê yên welatên Rojhilatê Ewropa, îro li Budapeşte dicivin, ji bo ku biryara belavkirina Pakta Warşow bidin. Wek tê zanîn, berê di navbera wan welatan de wekheviyek li ser felişandina Paktê hatibii pêk anîn. Civîna niha tenê bi awayek formaUte dê biryara belavkirina Paktê bigire..

Xwepêşandanek din a mezin di paytextê Sovyetê Moskova de, ji bo piştgiriya Boris Yeltsm pêk hat. Nêzîkî 40-hezar kesan piştgiriya xwe bi Yeltsin re anîn zimên. Li hember siyaseta Gorbaçov, hevkariya xwe li gel Yeltsin nîşan dan.

Şerê erdê li dinyayê bi hîsên cuda cuda hate qebiilê.

Yekîtiya Sovyet acizbiina xwe, ji şer re dîyar kir. Serokdewletê Misrê Husnî Mubarak, got ku:
92
-Leşkerên Misrê di şerê erdê de dê nekevin axa Iraqê.
Xwendevanên unîwersîteya Qahîre, yên ku protesto li dij şer kirin ii polîs ketin nav hev. Urdun ii Cezayirê jî nerazîbiina xwe, ji destpêka şerê erdî re dîyar kirin. îsraîl jî dîsa daxuyanî da, ku dê U dervî şer bê.
Wekî ku Ajansa îranê - ÎRNA da xuyanî kirin, ji roja destpêka şerê erdî di 17'ê Sibatê de heta îro 5000 kes li Iraqê, di nav de zarok, jin ii pîr ji ber tunebiina dermanan mirin e. Nexweşiyên ku zii belav dibin jî, dibe ku U Iraqê dest pê bikin.
Do li Stockholmê, çend hêzên Kurd bi hevre, panêlek bi navê " Şer ii Kurd " bi dar xistin.
Gazinek di nav Kurdan de belav dibe, ku siyasiyên Kurd raya gştî ya Kurd bi pozisyona xwe nadin nasandin. Şer derket ii nêzîk e ku biqede . Ji nii ve sîyasiyên Kurd U ser şer dîtinên xwe dîyar dikin.
Civîn ji alî Komîteya Hevkariyê Hêzên Siyasî yên Kurd ii Kurdistanî li Swêdê (HEVKARÎ) hatibû pêk anîn. Tê de li ser navê TEVGER Kemal Burkay, bi kurtayî dîtinek li dijî şer xuya kir. Li ser navê Bereyê Kxirdistana Iraqê Dr. Mecîd Cafer dîsa li hember şer axaft ii dîtina niinerê PDK - îranê Selîm Baban li ser şer baş diyar nebii. Li ser navê Partiya Demokrat a Kurd a Pêşverii ya Kurdên Suriyê Azad Cigerxwîn dîtinek, ku şer ji alî Iraqê ve hatiye destpêkirin ii her çend ne dostên me jî bin hilweşandina rejîma Iraqê ji

bal hêzên Hevkar ve, ji me re jî baş e - got. Herweha wî rexne li Gorbaçov ii polîtîka Sovyetê girt, ku ew dixwazin Saddam xelas bikin.
Welatên Rojava yên Ewropa, Pakta Worşow feUşandm.
93
Kuweyt rizgar bû
'26ê Sibatê
îro şerê Kendavê kete proseseke ii girîng. Hêzên Hevkar ketin Kuweytê. Kuweyt hate rizgarkirin. Bu-yara 660 a YN jî, ji bo derxistina hêzên Iraqê ji Kuweytê kete jîyanê.
Lê, dîyar e, hêzên Hevkar naxwazin tenê bi rizgarkirina Kuweytê, êrişên xwe li dij Iraqê rawestînin. Xuya ye, şer di nav axa Iraqê de dê dom bUce. Bi taybeti DYA ii Brîtanya ên ku naxwazin Saddam pêşberê xwe li ser masê bibînin, ji bo hilweşandina hêzên Iraqê yên leşkerî şer didomînin.
Gorbaçov daxwaz ji Komîteya Ewleti ya YN kir, ku bicive.
"An dê pêwendiyên me bi Amerîka re xerab bibin" got.
27ê Sibatê
Di navbera Hêzên leşkerî yên Komarî yên Iraqê, ku ketine çembera hêzên Hevkar ii hêzên Hevkar di nav axa Iraqê de şerekî berfereh dibe. Telewizyonên dinyayê nîşan didin, ku çawa leşkerên Iraqê yên di şer de hatin şikestm xwe teslîmê leşkerên Hevkar dikin. Leşkerên îraqê perîşan in. Bi hezaran ji kozik û çeperên xwe yên bin erdê der dikevin ii dest ii lingên leşkerên hêzên Hevkar diramîsin. Tê gotin ku leşkerên îraqê bi rojan in ku di kozik ii çeperên xwe de ti ii birçî ne. Li benda hatina leşkerên Hevkar in ku xwe teslîmê wan bikin.Trajediya

şikestina leşkerên Iraqê di ekranên telewizyonan de, ji bo raya gştî ya cîhanê tê pêşkeş kirin, . Niha tû sansur li hemberê rojnamevanan nîne. Hevkar ji bo propaganda xwe, rê didin rojnamevanan ku serbest kar bikin.
Hêzên Hevkar dîyar dikin, ku di rojek de tevayiya Kuweytê hatiye rizgar kirin. Meydana şer niha jî Iraq e. Leşkerên îraqê yên mayî bi paş ve ber bi Basra ii Bexdayê ve dUcişin. Hêzên Hevkar ji hewa, erdê ii avê ve der ii dor
94
li wan teng dikin. Balafirên hêzên Hevkar bi tonan bombe ii guUe bi ser wan ve dibarînin. Li pêş wan pird ii neqeban firandin ii xerab kirine ii dikin. Fort ii peshên Saddam derew derketin. Leşkerên wî nikarin çek biteqînin. Ji sedî not dest nabin tetîka çek. Panîk, rev ii dUbiin heye. Ji navê rakima hêzên leşkeriyên îraqê bi du-sê rojan ve girêdayî ye. Heger heta du-sê rojan jî şer dom bike ordiya îraqê namîne.
'28ê Sibatê
Hevkaran di kathejmar 06.00 de biryara rawestandina şer gihandin leşkerên xwe. Piştî sê saetan Iraqê jî biryara rawestana şer girt. Do daxwaza Iraqê ya rawestandina şer nehatibii qebulkirin. Lê, îro bi daxuyaniyek ji Qesra Spî ya Waşîngtonê ve, biryara rawestandina şer gihişte tevayiya dinyayê. Û herweha hêzên leşkerî yên îraqê yên mayî ji kuştinê rizgar biin. Lê ordiya îraqê bi 100 hezaran kuştî ii jî dîl U pey xwe hişt. Aparata leşkeriya îraqê perçe perçe bii.
Hêzên Hevkar ên ku Hêzên Leşkerî yên Komarî şikandin, bi biryara xwe ya rawestandina şer, xuya dikin,

ku dev ji xistina Saddam jî ne berdan e. Planên xistina Saddam dîyar e, bi riyên din dê bê pêk anîn.
Hevdîtinên li ser aştiyê jî, bê guman li gor daxwazên Hevkaran dê formek bigre. Tiştê Saddam bike yê mayî, bi bikaranîna hemii îmkanan hiştine xwe li ser hukmê Iraqê bide qebiilkirin e. Ew jî bi riyên dostên xwe, ku bikaribe vî tiştî bidest bixe. Di rêza yekem de jî dê Sovyet we re. Lê, ji niha ve xuya dike, ku dê Sovyet jî nikaribe Saddam rizgar bike.
95
DINYAYE KUWEYTE RIZGAR KIR,
PÊŞMERGE Jî KURDISTANÊ RIZGAR DIKE
Şerê, ku dinyayê bi mehan mijiil kir, ê ku di vê demê de, di jiyana siyasî ya dinyayê de bii pirsa herî girîng, piştî qebiilkirina ji aliyê Iraqê ve, hemii şertên DYA ii hêzên Hevkar, di roja 28'ê Sibatê de, bi erêkirina Komîte ya Ewletî ya RYN, bi biryar a danîn a çekan, rawesta. Lê, herweha ew nayê mana ya ku şerê Kendavê bi tevayî qediya.
Ji bo vê pêwîst e, Iraq van 8 - şertan bicîh bîne ii di demek kurt de, bersiva wan ji Qesr a Spî ya Wasîngtonê re bide xuyakirin. Ev şert di roja 22 - yê Adarê de, ji aUyê DYA ve ji bo danezanên ragihandinê re hatin belavkirin. Li gor wan:
. 1Roja yekem : Komîte ya Ewletî ya RYN, biryara rêkirin a xwarinê ji bo Iraqê qebiil dike. Pêwîstî yên din ên bingehîn di destê Komîte ya Sezayê de ye, ku çavdêriyê dUce, gelo çawa Iraq şertên RYN bicîh tîne ii weha biryar a rêkirina tiştên din ên bingehîn digre.

. 2Roja duwem : Serokê RYN Perez dê CueUar bi Iraqê ii Kuweytê re li ser pirsa sînorê civînekê bidar dixe ii biryar li ser vê pirsê digre. Ew, herweha biryara bicîhkirin a leşkerên RYN, ku çavdêri ya vê biryarê bikin digre.

. 3Roja 15 - an derengtir : Iraq sîstema xwe ya çekdarî ya giran, çekên kîmyewî ii bîyolojîk, ji RYN re vedike. Herweha eger amadebiinên Iraqê yên nii hebin ji bo sazkirina sîstemek niijen a çekdarî, pêwîstê ew jî ji bo RYN bêne vekirin.

. 4Roja 30 - an an ziitir : Serokê RYN xesarên ji şer pêkhatine hesab dike. Ji bo vê çendê fondekê di damezrîn e, ya ku xesarên şer ji firoştina petrola Iraqê derdixe.

. 5Roja 45 - an an ziitir : Serokê RYN , komîteyeke taybetî dê deynê ya ku çavdêriya sîstemên çekên giran ên Iraqê bike.

96

. 6Roja 60 - an : Komîte ya Ewletî ya RYN biryara erêkirin a, rakirina çend cezayên girîng a embargoya U dijî Iraqê ye dê werbigre.

. 7Roja 90 - î an ziitir : Komîte ya Ewletî ya RYN biryara erêkirin a rakirina tevayiya embargoyê ku li dijî Iraqê' ye dê werbigre.

. 8Roja 120 - an : Serokê RYN planekê amade dike - ji bo qedexekirina pêkanîna sîstemên nii yên çekên giran ji bo Iraqê ii bikaranîna wan.

Herwekî, ku heta niha diyar biiye, ku hemii daxwazên Dewletên Yekbiiyî yên Amerîka, di warê pirs a Xelîçê de ji bal RYN ve hatine qebiilkirin, xuya ye ev şertên nii jî beramberê

Iraqê - ji bo bi tevayî qedandin ii rawestandina şer, dê bên erêkirin. Lê, li aliyê din, ne diyare ku Iraq dê çawa bersiva van şertan bide. Tenê yek tiştî mirov dikare bibêje, ku Iraqê ala teslîmîyetê hildaye ii ji bo vê çendê hîn dê gelek caran pêwîst bibe serê xwe deyne. Altematîv a din jî, wekî ku têkoşînê ji bo destpêkiriye - rakirin û riixandin a rejîma Saddamê Tekrîtî ye.

Mirov heger bi rêz, çavekî ji biiyerên ku ji meha 7 - an heta niha li Rojhilata Navîn ii bi taybetî U derdor a XeUçê pêkhatine derbas bike, bêgiiman dê bi tabloyek enteresan ii balkêş re berbiçav bibe.

Biiyer a herî girîng ii bingehîn, wekî ku her kes dizane- dagîrkirin a Kuweytê, di roja 2 - ê tebax a 1990 - î bii. Rejîma BAAS ii serokê wê yê dîktator Saddam, bi ti awayî daxwaz ii hêvî yên dinyayê, ku bê şer ii şert ji xaka Kuweytê derkevê pêk ne anî. Ji ber vê çendê, şeva ku 16 - ê çileya paşîn bi 17 - an ve girêdide, di saet 00. 30 de şer destpêkir. Piştî mehek ii nîvê şerê belafiran, derbeyek a herî mezin li sîstema giran a çekdarî, çekên bîyolojî ii kîmyewî yên Iraqê ket. Pêwendiya leşkerî di nav esker ên Iraqê di nav Kuweytê de ii yên li ser xaka Iraqê de ji hev hate birîn. Koordînasyon a leşkerî ya di navbera naven-

diya leşkerî ii hêzên wan de qut bii ii ew ji hev hat xistin. Wekî, ku ji serokatiya leşkerî ya hêzên Hevkar li paytexta Siudî Erebistanê Rîyadê ve hate belavkirin, ji % 80 îrade ya berxwedanê ya leşkerên Iraqê di şer de hate şikandin. Bi ser van hemii tiştan jî, ya rastî di dinyayê de tu kesî bawer

nedikir, ku di mehek ii nîvê de hêzên Hevkar ên ku ji nêzî 30 dewletan pêk dihat ii DYA dê nikaribin Iraqê bi çokan bixin erdê. Lê belê, di dawî de di navbera 100 saetan şerê erdî de, Iraqê 100 000 leşker windakirin ii nêzîkê hevqasan jî xwe teslîmê leşkerên Hevkaran kirin. Iraqê hemii qeyd ii şertên RYN qebiilkir ii xwe ber bi sînorê xwe yê berî 1 - ê tebax a 1990 - î ve vekşand. Saddam Huseyn El-Tekrîti yê ku Kuweyt wekî wilayet a 19 - an a Iraqê dabii diyarkirin, di roja dawî ya şer de, di Radyo ya Bexdayê de daxuyanî dida, ku " ji îro pê de Kuweyt ne wilayet a 19-an a Iraqê ye ". Herweha, wî di axaftina xwe de da nîşandan, ku çawa " leşkerên Iraqê yên qehreman, mala hêzên Hevkar xerakirin e ii ew mecbiirê rawestandina şer kirin e " (!). Axaftinên Saddam tiştek biin ii rastî tiştek din... Kuweyt - ji şer welatekî xerakirî, yê ku di bin dii yê reş ê agir ê petrolê yên ku Iraqê şewitand de derket ii ji welatê ku di tevayiya dinyayê de - welatê herê dewlemend bii - gelekî diir ket. Xesar a Kuweytê, her çend heta niha nehatiya hesibandin jî, tenê bi xesarên tebîatê bii tehliikeyek tebîî ji tevayiya herema Rojhilata Navîn re. Tiştekî din ê herî balkêş ev bii, ku piştî rizgariya xwe gelê Kuweytê, ji bo şahî yên azadiyê bi hefteyan li hêviya Emîr ê xwe Şeyh EI Sabah bimîne. Belê îro biiyer jî ii encamên wan jî U ber çavan in - Kuweyt, piştî 7 - mehan ku bi dehên dewletan ji bo " rizgariya " wê leşkerên xwe xistin şer, dîsa welatek azad, xwedî sînor ii mekanîzma dewletê ye. Her çend ji bo avakirin a Kuweytê dehên salan pêwîst bibin jî, ji niha ve monopolên Ewropa ii DYA' yê

dest bi rekabeta avakirina wê kirin jî.

98

HESABEN SADDAM EN MALE

Û SÛKÊ LI HEV DERNEKETIN!

Biiyer a din a herî girîng rewşa Iraqê ye. Berî Krîz a Xelîçê, wekî hate diyarkirin, Iraq ber bi hêza çaran a leşkerî di tevayiya dinyayê de diçii. Her çend Bexda, ji şer ê 8-salan bi îranê re, bi deynekî gelek giran - nêzî 100 mUyar dolar - derketibii jî, di nav heremê de ii bi taybetî jî, di nav welatên Ereban de bii bii xwedî peyvek giran. Li gora Saddamê Tekrîtî ev peyva giran pêwîst bii wekî kulmekê li dewletên Ereb ên dewlemend, lê zeîf in ketiban e. Lê, hesabên malê ii siikê li hev demeketin. Hat dîtin, ku welatek wekî Kuweytê jî, gava pirs tê ser berjewendiyan-xwedî pişgirîyek gelek gelek fereh e. Ji xwe, ev tişt îro ji Iraqê re baş diyar e. Tiştê li Kuweytê ji bal Iraqê ve hate kirin, bi zêdetirîn ii dijwartirin hemberê Iraqê, ji bal hêzên Hevkar ve hat kirin. Tevayiya Iraqê, bi taybetî jî cîh ên meqerên eskerî, bi dehên hezaran car ji bal belafirên Hevkaran ve bombardiman biin. Rewşa jiyanê li Iraqê vegeriya sedsala XIX - an. Sîstem a elektrîkê, av a vexwarinê, sîstem a telefon, telewîzyon ii koordîne ya parastinê ya elektronîk ji 3 / 4 di tevayiya xaka Iraqê de hate hilweşandin. Iraq wekî welatek xerabiiyî ii serîtewandî ji şer derket.

Dervî ku hesabên malê ii siikê yên Saddam li hev demeketin, herweha piştî rawestan a şer, heta niha (23 - yê adar a 1991) man a rejîma BAAS bi xwe le ser hukim, ne diyar

e ii şerê opozisyon a Iraqê, bi taybetî jî ya Şîî' yan li dijî rejîma Bexdayê her berfereh dibe. Li gor deng ii ba's ên hatUi belavkirin, di 22 - yê adarê de, di Bexdayê bi xwe de muhalefetê dest bi çalakiyên leşkerî kiriye ii şer di navbera leşkerên bi Saddam re ne ii li dij in destpêkiriye. Ji aliyê din ve Saddam jî dest bi " demokratbiinê " kir (!). Di roja - 17ê adarê de, di axaftina xwe di Telewîzyon a Bexdayê de.
99
wî diyarkir, ku " amade ye ji bo destpêka jiyanek demokrat di Iraqê de. Li gele, ku partiyên cuda di Iraqê de eşkere)legal) karbikin. Mîllet ê Iraqê vekirî dîtin, raman ii rawêja xwe bibêjê. Rexne dijî rejîmê serbest bê kirin. Di vî warî de Saddam " reform " a xwe ya yekemin jî, di roja 23 -ê adarê de pêk anî. Sadiin Hammadî musilman ê Şu, yê ku heta niha aUkarê Serokwezîr bii, bii Serokwezîr ê Iraqê. Tariq Azîz jî, yê ku heta niiha Wezîrê derve bii, hat şiin a Hammadî ii bii alîkarê serokwezîr ê Iraqê. Wek tê zanîn heta îro ji dervî Serokkomar ii Serokatiya hemii kar ii barên leşkerî, Saddam Huseyn Serokwezîrtî jî dUcir. Ew dê her du karên din berdewam bike.

Piştî şer bi awakî vekirî hat dîtin, ku germbiina îranê nîşanê Iraqê dikir, di dem a şerê Xelîçê de ne bi dilsozî hatibiiye kirin. Ji ber ku, hîn bi rawestan a şer, Şîî yên ku dest bi şer li hemberê Bexdayê kirin, diyarbii alîkariyê ji Tehranê werdigrin. Her çend îranê ev tişt qebiil jî nekir, lê li gor agahdariyên ji heremê tên, leşkerên Iranê bi xwe, ji bo ku meqerên " Mucahiddîn ê xelk " (rêxistin a li dij îranê bi alîkariya xurt a Iraqê têdikoşe) li Iraqê biriixênê,

ketiye erdê Iraqê bi xwe. Serokên Şîî yan ji ekranên telewîzyon a Tehranê, serkeftinên şerê xwe li dij Bexdayê dan xuyanîkirin. Wan dîyar kir, ku kontrola bajarên Necef, Kerbela, Basra ii bi dehên bajarên din ên biçiiktir ii zêdeyiya herem a Bakiir ê Iraqê di destên wan de ye.
Di dema piştî şer de, em biin şahidên pêwendiyên fereh di navbera muhalefet a Iraqê ii tevgera Kurd de. Ji bo ku di bin alayekê de - Şîî, komunîst, BAAS'î yên pêşberê Saddam, Nasirî ii hêzên din ên muhalefet a Iraqê kom bibin, gelek civîn hatin bidarxistin. Rengarengiya dîtin, îdeolojî ii altematîf a pêşeroja " Iraqek çawa ? " di nav hêzên cuda de, bê guman bi awayek cuda jî tê zimên. Di roja 22 - ê Adarê de danezanên ragihandinên cîhanê ev niiçe belavkirin, ku rêberiya muhalefet a Iraqê, ji bo ku bi-
100
karibe şerê U dij Saddam bi awakî xurt di cîh de birêve bibe, dê biçe ser xaka Kurdistana Iraqê.
Piştî derxistin a leşkerên Iraqê ji Kuweytê , bidestxistin a parçeyek ji xak a Bakiirê Iraqê ji bal hêzên Hevkar ve ii danîn a çekan, li Rojhilata Navîn trafîk a dîplomasî, gihişte encamek bilind. Roj tiine ye, ji dem a rawestan a şer heta niha, ku di navbera dewletên heremê ii welatên Ewropa Rojava yan DYA re pêwendî yên dîplomatî nebu.\
Di vê germbiina jiyan a siyasî de, girîngtirin pirs - peydakirin a çareyekê ji bo problem ên Rojhilata Navîn, aştî ii ewletiya heremê ye. Di vî warî de dest bi planên pratîk jî hate kirin. Her çend di dem a şer ê Kendavê de, bi hemii hebiina xwe Rexistin a Rizgariya Filistînê (PLO) li gel

Saddam cîh girt jî, pirs a Filistînê ji bo çareserkirinê tê rojeva siyasî. Israîl bi xwe nîşan da, ku amade ye dest bi pêwendiyan bike - ji bo çareserkirina pirs a Filistînê. Lê, her li gel vê dîtinê jî, diyarkir, ku PLO wekî rêxistinek terorîst dibîne û td caran dê pê re pêwendiyek bidar nexe. Lê, eger mirov li biiyerên pêkhatî di dem a dawî de li Rojhilata Navîn temaşe bike, bêguman dê bibîne, ku girîngtirin ii dînamîktirin pirs li Rojhilata Navîn pirs a Kurde.

AXA BAŞURE KURDISTANE

DI DESTÊ GELÊ KURD DE YE

Şerê neteweyê Kurd - ji bo bidestxistina mafên xwe yên neteweyî, wekî hemii neteweyên dinyayê, ne ji do ii îro ve ye. Ev 150 - sal in, piştî ketina Mîrîtî ya xwe ya dawîn ji bal împaratorî ya Osmanî ve heta niiha çek di destan de, şer ii têkoşîn a xwe didomîn e. Cama ji bo demek kurt serketin, lê paşî dîsa şikestin, bindestî ii li ser xaka xwe bê maf... bii

jiyan a wî, bii jiyan a her Kurdekî xwedî hîs ii xwedî dU...

Di vê dîrok a dagirtî bi riipelên şeref, berxwedan li têkoşînê, bi serî netewandinê pêşberî hemii zilm ii neinsaniyetê, gel ê Kurd gelek dUctator ii faşîst naskirin. Di nav wan de, cîh ê Saddamê Tekriti - cîhek xiiya ye.

Saddam ê ku berpirsiyariya herî giran a qetlkirin a zarokên Qaladizê, şehîdbiin a 5000 - zarok, jin ii pîr ên Kurd li Helepçeyê, windakirin a 8000 - Barzaniyan, li ser milên wî ye, berî çend rojan di telewîzyon a Bexdayê de weha got : " Kurd ên hêja ! Bi ya çend kes ên ku dbcwazin

we bînin leyistikan nekin. Tevger a Kurd her dem bi alîkariya hêz ên derveyî ve hatiye geşkirin ii vê carê jî weha ye. Ew an dest datînin ser çek ên meqerên me, yên ku kes di wan de tune ye. Çekên xwe bere deynin ! Wekî din em ê serê wan bipelixînin" !

Saddam wekî her car dîsa derew dikirin. Pêşmerge yên qehreman, ên ku bi çalakiyên xwe yên serfîraz, her roj agahdariyên pîroz dighînin danezanên ragihandinên cîhanê, tenê di serkeftina xwe di şerê Zaxo' yê de dan nîşandan, ku şerê wan şerekî çawa ye. Li gor ajansên dinyayê, bi hezaran leşkerên Iraqê wekî dU ketina destên pêşmergan de. Bi hezaran jî, yên ku ji tirsan reviyane, ketin e sînorên Tirkiyê ii îran ê. Hukimet a Tirkiyê bi xwe ev rastî qebiilkir, ku bi hezaran leşkerên Iraqê di nav wan de subay jî bi rev ketin e nav xakên başiirê Rojhilat ii Rojhilatê Tirkiyê (Bakiirê Kurdistanê(

Serfiraziyên pêşmergan ii daxiiyanî yên wan, ku Kerkiik di dest wan de ye, dawî bi kamerayên telewîzyonên Japonyayê, ji bo hemii dinyayê hatin nîşandan. Pêşmerge bangdikin - Bijî Kurd ii Kurdistan! Pêşmergeyek di dest de kêr suretê Saddam xera dikir û di nav bajêr bi xwe de pêşmerge şerê helîkopterên Iraqê dikirin... Bi vî awayî, carek dm pêşmergan nîşan dida ii dmyayê hemii di dît, ku Kerkiik Kurd e ii bajarê Kurdistanê ye.

102

Suleymaniye bii pîroz a yekem, ku hatiye rizgarkirin, paşî wê Amediyê, Xanikîn, Hewlêr, Zaxo, Dixok ii... Helepçe... Helepçe ya şehîd. Nuha şehîdên Helepçe - ew

pênc hezar ii belkî zêdetir dikarîbiin ewran biqetînin ii temaşe bikin - Di roj a 3 saliya bîranîna Helepçe de, ew di destên pêşmergeyan wan de bii.

Her weha di pêwendiyên dîplomasî de, Bereyê Kurdistana Iraqê U gor agahdariyên tên, diyar bii dest bi aktîvîtetên fereh kirin e. Di nav vê demê de, agahdariya sensazyonal ji bal Serokkomarê Turgut Ozal ve, gava bi rê ya Moskovayê bii, ji bo ziyaret a resmî bi Gorbaçov re hate belavkirin. Özal got:

"Me pêwendî bi Bereyê Kurdistana Iraqê re daniye. Ji bo vê çendê di 8 - ê Adarê de, du serokên wan hatin. Yek Ceîaî Taîabanî û yê din jî nuner ê Mesud Barzanî, Muhsin Dizayî bû. Ew an, bi nunerên me yên Wezareta Derve, yên îeşkerî û parastinê re rûniştin. Me dîtin û hêvîyên xwe ji bo wan diyarkirin û wan jî yên xwe gotin.

Em ii Kurd bi hevdu re dijin, çima wekî bira em li hevdii nekin. Ji nuha ii pê de divê em piştgiriya Kurdan bikin. Divabii berê jî me piştgiri ya Kurdan bikira, hingê jenosîd a li Helepçe jî pêk ne dihat".

Piştî vê biiyerê heraret a siyasî pir bi jor ket. Hemii partî yên muhalefetê li Tirkiyê, yên ku di Parlamento de beşdar in, wekî gmbên siyasî nerazîbiina xwe ji kare Özal re diyar kirin. Li gor dîtin ii rawêj a wan, kar ii barê Özal, karek şexsî ye ii parastina dewleta Tirkiyê dixe xeterê. Her weha berî çiin a Özal a Waşîngtonê, hemii partiyên siyasî yên Parlamento ya Ankarayê bi taybetî jî kurê Paşê Erdal înönii ii Suleyman Demirel ii her weha Kenan Evren jî daxuyanî dan, ku Ozal nikare tu tawîzan bide Bush li ser

pirs ên Kurd, Ermenî ii Qibrisê.
103
Piştî hevdîtinên xwe li Enqerayê bi siyasetvanên dewlet, leşker ii parastina Tirkiyê re Celal Talabanî hevpeyvîn bi radyo ya BBC ii Ajansa Niiçeyên Kurdistanê (ANK) re kirin. Wî di hevpeyvînên xwe de dîyar kir, ku tu tawîz nedan e Tirk an. Lê, dîtinên xwe ji hev re gotin e. Di gelekên babetan de wekhevî di helwestên wan de hebiiye ii di hinekan de jî cudabiin di dîtinên wan de derketine holê.
Heta niha ne dîyar e, gelo Bereyê Kurdistana Iraqê, yên ku ji % 95 axa başiirê Kurdistanê di destên xwe de digirin, dê bi biryarek çawa Pirs a Kurd ber bi çareserkirinekê ve bi rê ve bibin. Hîn gelek tişt der dora pirs a Başiirê Kurdistanê ve ronî ne bii ne. Rojên nêzîk dîyar in. Em dê çarçova pu-sa Kurd de, bibin şahîdên kirinên redîkal.
Cemal Batun
104
KURDAN SERIHILDA
ll'ê Adarê 1991
Ji Kurdistana Başiir baş niiçe nayê stendin. Di herêma Kurdistanê de bê dengiyek heye. Ordiya Saddam li wir jî ketiye panîkê. Xelkê herêmê dest bi serî hildanê kirine. Lê, baş agahdarî tune(*) .
Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal çii Moskovayê. T. Özal di balafirê de, ji rojnamevan re got ku "di vê heftê de Celal Talabanî ii temsîlvanê Mesiid Barzanî hatin Tirkiyê".

Li ser pirsên rojnamevanan, Serokkomarê Tirkiyê
Turgut Özal, weha bersiv dida:
-Kurd di herêma me de dijtn. îngiîiz, Amerîka û
dewietên din yên Rojava wan bi resmî qebûî dikin û bi
wan re rûdinin, lê çima em bi Kurdan re rûnenin? Em
dixwazin îi bakurê îraqê dewîeteke federatîf avabibe û
Kurd û Tirkmen jî di nav vê federasiyonê de bin. Garantoriya
vê dewîeta han jî, yek jê Tirkiye be; an jî Tirkiye,
Suriye û îran bin. Li Tirkiyê jî, 12 miîyon Kurd hene.
Kurd neteweyek in. Divê Tirkiyê hamîtî îi Kurdan bike.
Lê, em îi dij dewîeteke serbixwe ya Kurdan in. Em bi
(*)Paşê dîyar bû, ku di 3'yê Adarê de cara pêşî 11 herêma Ranyayê serîhilda û serîhildan berfireh dibe. Di 5'ê Adarê de leşkerên Saddam ji herêmê revîn. Di 8'ê mehê de xelkê Silêmaniyê jî radibe. Hêzên pêşmêrge gîhane alîkariyê. Serokên emnîyet û leşkeran revîn. Qasî 850 ajan hatin kuştin. Di 9'ê Adarê serîhildan gehîşt Şeqlewayê. Di lO'ê mehê de. Rewanduz, Dîyana û di ll'ê Adarê de jî Hewlêr di navbera çend saetan de rizgar dibe. Û di 20 Adarê de bi hezaran hêzên çekdar ên kurd bi ser Kerkûkê ve digrin û di roja 21 'ê de aliyekî Kerkûkê ji destê leşkerên Saddam rizgar dikin , lê şer dom dike. Saddam giraniya xwe dide ser bajarê Kerkûkê.

105

qetîyet, îi bakurê îraqê dewîeteke Kurd ya serbixwe naxwazin.
Heger çêbibe jî, em dê bi xwe mudaxelê wê bikin.
Ev niiçe li Tirkiyê wekî bombeke teqîya. Muxalefet li dij
hatin ii hevdîtina Tirkiyê ii Kurdan derket. Muxalefetê,
Turgut Özal bi xayîntiyê îtham kir.
Li gor niiçeyan, Kurd li Kurdistana Iraqê gelek herêman

girtine bin kontrola xwe. Di nav de bajarê Silêmaniyê jî heye. Li gor niiçeyan, Iro jî hêzên Kurd derdor li bajarê Hewlêrê girtine ii Hewlêr U ser ketinê ye.

'12ê Adarê

Li gor niiçeyên ku ji Kurdistana Başiir tên, gelê Kurd li dij rejîma Saddam serîhilda. Li Başiirê îraqê jî, li bajarên Basra, Necef, Kerbela ii li hinek bajarên din yên ku Şîî lê dijîn U dij rejîma Saddam serîhildan her ku diçe geş ii berfireh dibe. Lê, yek bi rastiyê nizane, ku U herêmê çi dibe ii diqewime. îmkanên masmediya cîhanê tuneye, ku niiçeyên rast ii teze bigire ii belav bike.

'13ê Adarê

Bereyê (Cepheyê) Kurdistanê bi gelê Kurd re bii yek ii pêşengiya serhildanê girt destê xwe. Ew Kurdên ku heta niha bê teref biin ii yên ku di ordiya îraqê de leşker biin, dest dan ser çek ii cebilxanên ordiya îraqê. Wan ji bo serîhildanê bangê partî ii hêzên Kurd kirin, ku werin ii bi hevdu re, li dij rejîma Saddam şer bikin. Mesiid Barzanî bi pêşmêrgan ve kete Kurdistanê.

14ê Adarê

Li bakur ii başiirê îraqê Kurd ii Şu şerê berxwedanê berfireh kirin. Li Kurdistanê çend bajarên biçiik ketin destê

hêzên Kurd. Bereyê Kurdistanê bi pêşmêrgeyên xwe ve li Kurdistanê cîh dibe ii xwe ji şerê mezin ii giran re amade dike.

'15ê Adar ê

Li gor radyo ii televîzyonên cîhanê, Silêmaniye,

Helepçe ii Xaniqîn ketin destê hêzên pêşmêrge. Ordiya îraqê U Kurdistanê belav dibe.
Di 15-17 Adarê de Konferansa Parastina Mafê Gelê Kurd li Stockholmê civîya. Konferansê, bi dilşahî ii germî silav li şoreşê kir.
'16ê Adarê
Hewlêr bi temamî rizgar bii. Pêşmêrge derdor li Kerkiik ii Zaxoyê girtin. Ordiya Saddam li Kurdistanê bi

çekên xwe yên giran ve tesUmê hêzên pêşmêrge dibe. Balafirên Saddam hêzên pêşmêrge bombabaran kirin.
Amerîka, 2 balafirên îraqê xistin. U komiitanê Amerkîa yê hêzên Kendavê ultîmatomek da îraqê ii got ku:
-Li gor peymana şêrê, Iraq nikare baîafir û heîîkopterên xwe rabike û bikar bîne. Heger îraq baîafir û heiîkopterên xwe bikar bîne, ev îhîaîa peymanê ye û em dê dest bi şer bikin.
Hêzên Amerîka bi vê ultomatonê re 50 km ber bi Bexdayê ve meşîya. îraq tirsa ii dev ji bikaranîna balafir ii helîkopteran berda.
Piştî şer, îro cara yekem Saddam Huseyîn derket TV'ya îraqê ii gelek firehî li ser pirsa Kurd rawesta ii banga Kurdan kir:
-Piştî şer ez dê demokrasiyeke rastîn bînim Iraqê û dê Kurdên bira yên me jî, di nav vê demokrasiyê de otonomiya xwe û heqên xwe yên netewî û demokratîk bigrin...
Parlementoya Belçîkayê biryar girt ku pirsa Kurd bibin Koma Neteweyan ii heta ku pirsa Kurd çareser nebe, dê

Belçîka nehêle Tirkiye bibe Endamê Civata Bazara Ewropê.

'16ê Adarê di dîroka Kurd de, rojeke tarî ii şîn e. Roja qetlîama Helebçeyê ye. Piştî 3 salan îro Helepçe rizgar e ii di destê hêzên Kurd de ye. Di serî de li bajarê Helebçê U her derê Kurdistanê ii li seranserê Ewropa Kurdan qetlîama Helebçê bi civîn, mîtîng ii meşan bi bîr anîn. Li Stockholmê di roja 16 Adarê de,bi însîyatîfa Federasyona Komeleyên Kurd li Swêdê, qasî 3500 kesî bi meş ii mitîngeke, qetlîama Helepçê bi bîranî. Konferansa Stockholmê saetek nabeyn da civîna xwe ii gelek niinerên Konferansê beşdarê meş ii mitîngê biin. Dr. Mahmiid Osman li ser navê Bereyê (cephe) Kurdistanê di derheqê rizgarakirina axa Kurdistanê ii rewşa Saddam de agahdarî da

108

beşdaran. Televîzyon, radyo ii rojnameyên Swêdî gelek cîh dan meş, mitîng ii niiçeyên Konferansa Stockholmê.

irê Adarê

Kerkiik ii Zaxo ketin bindestê pêşmêrge. Ala Kurd li her derê Kurdistanê li ba dibe.

Mesiid Barzanî niiçevan ii rojnamevanên Ewropî vexwend)dawet kir) Kurdistanê. Rojnamevan ii niiçegîhanên Ewropî ji bo çiindina Kurdistanê, diçin Suriyê, îran ii Tirkiyê. Van her sê dewletan sînorên xwe ji bo rojnamevanan jî girtin. Konferansa Stockholmê 3 roj dom kir ii îro dawiya wê hat. Ji bo bi destxistina mafê gelê Kurd biryarên hêja girt. Ji bo pêkanîna van biryaran komîte pêk anîn ii deklerasyonek belav kir.

Hemii partîii hêzên Kurd U Stockholmê bi civîneke taybetî silav ii rêzên xwe pêşkêş kirin ii heta dawî pişgiriya xwe ji serhUdanê re dan dîyar kirin.
Gaveke pêşketî û pozîtîv:
KONFERANSA STOCKHOLMÊ
"Ev stemkariya ku îro îi ser Kurdan heye, di bingehê xwe de, îi ser aştiya cîhanê ye. Divê pirsa Kurdan di nav aştiyê de bêt çareser kirin. Ji bêyî pirsa Kurdan îi Rojhiîata Navîn aştî ne mumkun e".
Serokê Komîta Parastina Mafên Kurdan li Swêdê berêz, C.H. Hermansson bi van gotinên jorîn konferansa Stockholmê vedikir.
109
Komîta Parastina Mafên Kurdan li Swêdê, di 15-17 'ê meha Adarê ya 1991 'ê de, li bajarê Stockholmê bi 200 niinerî ve Konferansa Parastina Mafên Kurd pêk anî.
Ji her çar perçeyên Kurdistanê, Yekîtiya Sovyetê, Avustralyayê heta Ewropê ii Amerîkayê niinerên partî, rêxistinên demokratîk ii şexsîyetên Kurd yên serbixwe beşdarê Konferansê biin. Ji derê Kurdan gelek prof,. polîtîkvan, zanyar ii rewşenbîrên demokrat ii dostên Kurdan di Konferansa StockhoUnê de beşdar biin. Dîtinên xwe anîn zimên, pêşnîyarî anîn, alîkari ii piştgiriya xwe dan dîyar kirin.
Konferans ji çapemeniya Kurdan ii ya cîhanê re vekirî bii. Ji 50 kesî bêtir rojnamevan ii niiçehîgan temaşe ii guhdariya konferansê kirin ii li tevahiya cîhanê niiçeyên konferansê belav kirin.

Serokê Komîta Mafê Kurdan yê Mirovî li Swêdê C H Hermansson, di axaftina xwe ya vekirina Konferansê de, behsa rewşa Kurdistanê ii Kurdan a îroyîn kir. C. H. Hermansson:

-Ev stemkariya ku îro îi ser Kurdan heye, di bingehê xwe de îi ser aştiya cîhanê ye. Divê pirsa Kurdan di nav aştiyê de bêt çareser kirin. Ji derî pirsa Kurdan ii Rojhiîata Navîn aştî ne mumkun e.

Par, dema me dest bi hewldana amadekirina vê konferansê kir, em nedizanibiin dê rewşa Kurdan weha zii bêt guhartin. îro têkoşîna Kurdan êdî mêweyên xwe dide. Ez hêvîdar im, ku dê konferans di vî warî de biryarên berbiçav bigire.

Piştî pêkhatina dîwanê, wezîra Macir ii Penaberan a Swêdê Maj-Lis Lööw heqê axaftinê girt. Di axaftinaMaj-Lis Lööw de baş dîyar bii, ku dewleta Swêdê di poUtîka xwe ya di derheqê Kurdan de tii guhartin çênekiriye. Wê di axaftina xwe de Pirsa Kurd wek pirseke penaberi ii mafê mirovî da dîyar kirin.

110

-Hukimeta me geîek îi ser Kurdan radiweste û di vî warî de xebat jî kirîye. Swêd, îi herêmê piştgiriya demokrasiyê dike. Em îi her derî piştgiriya mafê Kurdan dikin; ew êş û jana ku îi ser Kurdan heye, em baş pê dizanin. Hinek Kurd hatin Swêdê. Lê, em nizanin, ku çend Kurd ii Swêdê hene. Bi texmînî qasî 10 hezar Kurd îro îi Swêdê dijîn...

"Gelê Kurd serokekî
bi hêz dixwaze"

Dîwanê mafê axaftinê da Prof. David McDowall. David McDowall, ji Londonê hatibii ii li ser perspektîva poUtîka Kurd peyîvî. Wî , rewşa Kurdan a dema Ösmanî ii ya niha bi mînakên dîrokî ii berçav da berhevdu. Bi kurtî weha digot:

-Em di demekî geîek girîng de dijîn. Niha geîê Kurd îi Kurdistana îraqê rabûye ser lingan. Serîhiîdaye. Berî çend rojan jî Turgut Özaî, bi Kurdan re civînek çêkir. Ev jî dîyar dike, ku Özaî dixwaze îdeoîojî û poîîtîka kemaîîst îi Tirkiyê bişkîne. ERNK jî ii Parîsê daxuyanî da ku Tirkiye bixwaze bi PKKê re têkiîiyan dêne, ew amade ne û dikarin çek bidin rawestandin. Ev tiştekî baş e.

Berî şer hinekan digot; " dibe, ku Kurdistaneke serbixwe çêbe. " Tirkiye ji vê yekê tirsiya, ku îraq perçe bibe. Tirkiye ji Şîîyan jî ditirse, ku li îraqê ew bêne ser îktîdarê. Ji ber van sedeman Tirkiye hewl dide ku zimanê kurdî serbest bike. Lê, bi tenê zimanê axaftinê. Heger kovar, rojname ii pirtiikên kurdî dîsan qedexe bin, ev ne tiştek e. Armanc dîsan xapandina Kurdan e. Ji bo pêşveçiina ziman ii kultura kurdî, divê pêwendî di nav hukimet ii Kurdan de

hebin. Lê, ew Kurdan asîmîle dikin ii dikujin.

îraq dibêje " belê Kurd hene," lê ji aliyê din ve, wan dikuje. Wek Bush dibêje; " divê li Rojhilata Navîn aştiyek hebe." lê divê Kurd jî di nav vê program ii plana aştiyê de bin. Ji derî Kurdan li Rojhilata navîn aştî ii demokrasiyeke rastîn nabe.

Di sedsala 18-an de Osmanî kesên din ji der ve danî

Kurdistanê. Ji aliyê din ve, Kurdan di navbera Osmanî ii Iranê de dUdrin tampon. Abdulhamîd digotin: " Em îslam in." Kurdan bi îslamiyê dixapandin. Mustafa Kemal vê polîtîka Osmanî dewir girt. Wî dît, ku Yewnanî ii Areb dixwazin Osmanî hilweşînin, berê xwe da Kurdan ii ji wan alîkari xwest. Gelê Kurd bii qurbana Komara Tirk. Herweha li îranê jî Kurdan kirin qurban. Biiyera Simko sîyaseta îranê dide dîyar kirin. îro ji li îranê rejima îslamî heye ii dîsan dixwazin Kurdan ji navê rabikin. Problema Kurdan ne ya îslamî ye, ya netewî ye.

Wek tê zanîn, îraq ji 3 wîlayetan çêbiibii: Basra, Bexda ii Kurdistan. Çi bii, dewleta merkezî çêkirin ii di dawî de Saddam Kurdan kuşt ii Kurdistanê wêran kir. Kurdan di nav 3 dewletan de kuştin, girtin ii rakirin. Ji Ş. Seîd re gotin; " paşverû ye." Giş derew bû. Niha jî dibêjin " îsraîl ii Dewletên Yekbiiyî yên Amerîka Kurdan bi kar tînin. îran jî PDK-I bi kar tîne. îro jî, ji bo ava Firad, Suriye PKKê bi kar tîne." Rast e. Ev dewlet hemii ji bo kara xwe dixebitin, kara Kurdan têde tune.

Kurd bi civata navnetewî bawer nakin. Mustafa Kemal wan xapan. îngilîstanê 1920 de got "em dê li îraqê pişta Kurdan bikin." Nekir.

Di dema Osmanî de herêma Kurdistanê ji aliyê aborî ii civakî ve bi paş ve hiştin. Giraniya xwe dan ser pêşvebirina rojava, ango herêma Tirkan. îro jî weha ye. Hemii industrî ii kompleksên wê li herêma Tirkan e. Bi ser re jî, hemii heyînên Kurdistanê dikşînin hêla xwe.

Polîtîka Osmaniyan, ew biin, ku dubendî dixistin nav eşîrên Kurdan. Wan berdidan hevdu. Osmaniya Alayên Hamîdiyê pêk dianîn. îro jî parazgerên gundan)köykomcusu) pêk anîne.

Gelê Kurd dixwaze serokekî wan yê bi hêz hebe. Hebiina eşîretan ji doza Kurdan re probleman derdixe. Dîn jî probleman derdixe. Kesên dîndar ji xwe re bi kar tînin. Sunî ii Şîî bi hevdu bawer nakin. Wan li dij hevdu bi kar tînin.

Dewlemendên Kurd ii xwedî ax bi dewletên re ne. Ev ji berê ve weha ye. Mesela, Kamuran înan bi xwe xwedî ax e ii mirovê dewleta Tirk e. Ji % 80 gundiyên Kurd bê ax in. Ew, U hember xwedî ax in. Hukimet pişta xwedî erd dike. Şoreşa PKKê ii yên din bi maf e ii li hemberê axayan e. Di bajaran de hestên netewetiyê pêşketî ye. Di dema Osmanî de jî weha bii. Xwendevan ii ronakbîrên Kurd li Stanbolê xebat dikirin.

Wî, sedemên cudabiin ii têkçiina Kurdan îdeolojiyê didît ii weha digot:

"ideolojîyê
şer xist nav Kurdan"

-Problema îdeolojiyê ji bo Kurdan gelek xirab bii. îdelojiyê, şer xist nav hêzên Kurdan. Divê mirov bikaribe rexne li hevdu bigre, lê, bi awayekî demokratîk. Ne ku hevdu bikuje, an bi hevdu re kar neke. Kurdan di sala -1918an de, li ser serxwebiin ii otonomiyê bi hevdu nekirin. Bi hevdu ketin. Hinek U dij M. Kemal ii hinek jî li gel wî cîh girtin. Ew rewş ii dîtin îro jî berdewam e. Gelo dê

bikaribin dewleteke serbixwe çêbikin? Ji ber ku pêwendiyên wan bi Siinî, Şîî ii Cuhîyan ve heye. Kurdên îraqê mumkun e, ku otonomiyê bi dest bixin. Problem ew e, ku dema dewleta Iraqê dîsa bi hêz bibe, dê otonomiyê ji
113
navê rabike. Bi baweriya min, dê li Tirkiyê mesela Kurd li pêş bikeve. îro gelê Kurd layîqê pişgiriya navnetewî ye. Ez nikarim ji gelê Kurd re polîtîka ii stratejiyek pêşkeş bikim. Ew bi xwe biryara xwe dide. Lê, ez dikarim ji Amerîka ii dewletên din re bêjim, "pirsa Kurd di nav pirsên Rojhilata Navîn de bigrin destê xwe." Heger welatên Rojava, aştiyeke nii dixwazin, pêwîst e, pirsa Kurd jî bigrin rojevê. Bila nebêjin " dê Tirkiye sil (tûre(bibe, an biqehre".

"Azadiya Kurdan bi pêşketina
edebîyata kurdî ve girêdayî ye"

Profesor Joyce Blau, (Paris) li ser perspektîva kultura kurdî axaft. J. Blau, di axaftina xwe de, got ku Kurd ji berî ve li ser axa xwe ne. Kurd ji dema Medan ve heta niha li ser axa xwe jîyane. Med bapîrên wan in. Kurdan heta niha gelek mîrîtî ii dewletên herêmî damezrandine. Mesela serokê dewleta Eyiibiyan ji Şeddadiyan bii. Şaddadî Kurd biin.

-Di sedsala 17-an de di medreseyên kurdî de muzîk, edebîyat, stran û kuîtura kurdî geîek pêşketibû. Ahmedê Xanî bi eserên xwe yên hêja hestên kurdayetiyê bi hêz kir. Ziman û kuîtura kurdî geîek kevin û dewîemend e.

Di sedsala 7-an de Ereb ii di sedsala 11 -an de Tirk hatin

herêma Kurdistanê ii êrîş anîn ser Kurdan.
-1924an de M. Kemal kurdî qedexe kir. Tirkî kire zimanê resmî. Şovenîzma Tirk bii polîtîka dewletê. Navê Kurd ii Kurdistanê qedexe bii. Navê Kurdistanê bii "Rojhilat" . Profesor J. Blau, li ser alfabe ii zaravayên kurdî rawesta. Li Kurdistana Başiir ii Sovyetê behsa pêşveçiina edebîyata kurdî kir. Di van çend salên dawî de, li Ewropa çawan ziman ii edebîyata Kurdî gulveda. J. Blau, azadiya Kurdan bi pêşketina ziman ii edebîyata kurdî ve girêda.
114
"Kurd bi serkevin,
dê xencerên xwe bikşînin"!
Profesor Johan Galtung (Stockholm) li ser rewşa Kurdan ii krîza Xalîcê axaft. Johan Galtung, bi kurtasî digot ku:
-Problem ne ya Kurda e; ya dewletên ku Kurdan din nav xwe de parkirine û yên ku ji wan re alîkariyê dikin e. Divê îi Rojhiîata Navîn hemû Ereb îsraîi qebûi bikin. Israîl jî Filîstîniyan qebûl bikin. Pirsa petrol û avê bêt hel kirin. Av giring e. Bi qasî petrolê girîng e. Li Rojhilata Navîn aştiyeke fereh bêt pêk anîn. Bazareke hevbeş çêbibe. îsraîl jî di nav de be.
Kurd di nav 5 împaratoriyan de hatine parvekirin. Sucê me Ewropayîyan jî divê yekê de heye. Bi taybetî IngUîstan. îro Kurd ne bi tenê bê dewlet in, hinek gelên din jî hene. Wek li Swêdê Samer, Filîstin, li Amerîka sorik (îndîaner(iiwh... îro Kurd bibin xwedî dewlet, sibê yên din dibin. Ji ber vê yekê, çima Kurd bibin dewlet? Kurd hemii dewletan

nas dikin, lê ew Kurdan nas nakin!
Dibêjin Kurd şervan in. Lê metodên din jî hene. Belkî Kurd li Gandiyekî bigerin. Belkî jî Gandiyekî rabe... Ewropayî li ser petrolê radiwestin. îhtîyaciya cîhanê bi petrolê heye. Divê xêra petrolê U Kurdan jî bêt parkirin. Sê tiştên girîng hene. Petrol, av ii dewlet. Divê mirov wan bi parve bike. Di hersêyan de heqê Kurdan jî heye. Divê di konferansa Rojhilata Navîn de, li ser van parvekirina hersê tiştan rawestin. Niha hinek dibêjin "heger Kurd bi serkevin, dê xencerên xwe bikşînin. Heyfa (tola) xwe bigrin".
Raste heyf girtin heye, lê ku mirov eynî metodî bi kar bîne.
Ewropayî dema neteweyên bê dewlet dibînin ii dibêjin"
115
ev sîstemeke klasîk e." Wek yê ku pereyê wî hebe ii bêje "pere ne tişt e." Kurd dixwazin dewleteke çêbikin, ku ev aparat di destê Ewropayiyan de bi xwe heye. Lê, Ewropî dixwazin dewletên super çêbikin.
"Divê Swêd
alîkariya însanî bike"!
Niinerê bereyê (cepheyê) Kurdistana îraqê Hoşyar Zebarî, di derheqê kirinên Saddam de, bi hejmar mînakan da ii di derheqê rewşa Kurdistanê ya nii ii çalakiyên pêşmerge de, bi kurtasî van agahdariyan da Konferansê:
-Niha li Kurdistana îraqê û îraqê serhildana gel heye. Kurd, EEreb, Asûrî û Tirk bi hevdu re, li dij rejîma Saddam têdikoşin. Piraniya axa Kurdistanê hatiye rizgar kirin. Ji Xaniqîn heta Silêmaniyê, Zaxo û Dihokê ketine

destê pêşmêrgeyên Bereyê Kurdistanê. Kurd di nav muxeîefeta îraqê de hêzeke giring in. Em dixwazin demokrasî bêt îraqê û ji bo Kurdan jî otononiya rasteqîn pêk bê. Çareserkirina meseîê helkirina pirsa netewî ye. Heta mesele Kurd îi Iraqê hel nebe, aştî nayê Iraq û herêmê. Em wek Bere dixwazin civata navnetewî bi awakî aştî meseleyê bigre destê xwe û hel bike. Bere, ji Swêdê daxxvaz dike ku ew pişgiriya însanî ji bo Kurdistana îraqê bike. Saddam û rejîma xwe dikarin hemû geîên îraqê bikujin.

"Programa TEVGERê ya dûr û nêz heye"

Li ser navê TEVGERê S. Dîcle axaft. Nûnerê TEVGERê, ji dîrok ii cografiya Kurdistana Bakur destpêkir ii behsa dema Osmanî ii Kurdan kir. Di dema Osmanî de polîtîka şovenîst a ku Kurdan kuşt, talan kir, koçbar, asîmîle, ziman ii edebiyata wan çawan qedexe dikir. Mustafa

Kemal vê polîtîka Osmanî dewr girt ii hîn tiijtir ii barbartir li ser Kurdan bikar anî. Wî, behsa di wexteke hewqas zor de, dîsan di navbera 1970 ii 1980' î de hestên kurdayetiyê çawan pêşket ii hêzên Kurd çawan xwe bi organîze kiribiin, kir. Bi taybeti pişti 1980'î dewleta Tirk bi awakî vekirî çawan Kurdistanê dagîr ii talan kir. Niinerê TEVGERê, di axaftma xwe de:

-Ji ber vê rastiyê TEVGER armancên dûr û dirêj ên miletê Kurd û yên acîl ên dema nêzîk tevî hev nake. Di armancên dûr û dirêj de, li pêş me serxwebûn heye. Lê, di yên nêz de bi kurtasî em dikarin weha bêjin: Divê hebûna miletê Kurd bê qebûi kirin. Qanûnên fevqalade û

Walîtiya herêmê bê rakirin. Ordî ji Kurdistanê vekişe.
gundên valakirî û şewtandî bên avakirin. Efûya gştî derkeve.
Divê pirsa Kurd di konferansa navnetewî ya Rojhilata
Navîn de cîh bigre. Kurd jî wek terefekî di konferansê
de beşdar bibin.
"Divê bûyera Qasimlo bê zelalkirin".
Li ser navê PDK-îranê K. Dawidî axaft. Dawidî, di axaftina
xwe de, behsa kirinên zilm ii zordestiya rejîma îslamî
ku di nav 12 salan de çawan li ser gelê Kurd kiriye anî
zunên ii di van 12 de salan de, çawan têkoşîn ii berxwedanan
dane. Di nav 12 salan de rejîma îslamî 50.000 Kurd
kuştine, dîyar kir. Wî, li Rojhilata Navîn Konferanseke
navnetewî pêşnîyar kir ii got ku:
-Daxwazeke me yê din jî, ji Konferansa Stockholmê
heye. Ew jî, Konferans ji bo kuştina Qasimîo rejîma
îsiamî protesto bike m ji bo dîtina qatilê wî, daxwaza zelalkirina
bûyera kuştina Qasimlo ji dewleta Avusturyayê
bike.
Dawidî di axaftma xwe de Piştgiriya serhUdana Kurdistana
îraqê kir.
117
Mistek ji çanda Kurdî
Komîtê, êvarê programeke kulturî pêşkeşî niiner ii
mêvanan kir. Helbestvan Şêrko Bêkes çend helbestên
xwe bi kurdî xwend ii paşê wan wergêrandin îngilîzî.
Niinerê AwistraUyayê nivîskar Şahîn B. Soreklî bi kurdî ii
îngilîzî du helbest pêşkêş kir.
Koma Dîlan bi lîstikên xwe şevê geş kir. Şivan ii

Gulîstanê jî, reng dan konferans ii şevê.
"Zordestî sist û çewsandin sivik bûye"
Kemal Ahmed li ser navê Tevgera Nîştîmaniya Neteweyê Kurd li Suriyê axaftinek kir. Niinerê Kurdên Kurdistana Suriyê Kemal Ahmed, behsa zordestî ii stemkariya 1962û ya ku piştê wê li ser Kurdan hebiin kir. Behsa koçkirina Kurdan ii ji deststendina axa Kurdan kir. Lê, li ser rewşa niha jî weha berdewam kir:
-Lê, di van salên dawî de hinekî zordestî hatiye sistkirin ii ew çewsandina berê sivik biiye. Wek numiine, girtîyên Kurdên sîyasî di zindanan de nemane. Pencereke demokratî ji miletê me re hatiye vekirin. Cara pêşî di dîroka Suriyê de tê dîtin, ku hinek niinerên Kurd diçin parlementoya welêt.
Tevgera Kurd xebata xwe ya demokratî - aştî didomîne. Çi U der ii çi li hundirê parlementoyê, bi cîhkirina daxwaz ii mafên gelê Kurd, wek:
*Naskirina meşrûtîyeta tevgera Kurd
*Ew dezgehên ku li herêma Kurd heye divê rengên xwe yên demokratîk bigrin.
118
*Gelê Kurd bibe xwediyê mafê xwe yên çandî, sîyasî û civakî
*Hilanîna hin sîyaset û planên ku bîhna şoveniyê ji wan tên
"Divê pirsa Kurd
here Koma Netewan"
Prosefor Şakirê Miho li ser navê Kurdên Sovyetê axaftineke

Kurt kir. Ji bo Konferansê çend pêşniyarên pratîk
pêşkêşî Konferansê kir:
-Ev Konferans sembolîk e. Dijberiyên (konflîkt(
herêmê ne yên dewletên biçûk in, yên dewletên mezin in.
Dema di herêm û cîhanê de dijberî hebin aştî çênabe.
Du riyên pirsa Kurd hene: yek bi rengeke aştî. Ya din jî
wek Helebçe jenosîd e. Pirsa Kurd bi metoda Helebçê nayê
hel kirin.
Ev Konferans divê rêçek bihêle. Sê tişt bikevin rê:
-1Divê di Koma Netewan (FN) de wek Filistîyan
nûnerê Kurdan hebe.
-2Divê Komîta Swêdê, ji konferanseke netewî re fotomateryalek
be. Wek 1963-an pirsa Kurd bibe Koma Neteweyan.
-3Bi argumentan agahdarî bidin dewletên mezin ku
pirsa Kurd bigrin rojevê.
"Divê hevkariyeke
rast û durust were pêşkêşkirin".
Niinerê PKK Maşallah Öztiirk, berî ku dest bi axaftina
xwe bike, rexne li Komîta amadekar girt, ku çima li ser
navê PKKê gazî wan nekirine. Di axaftina xwe de mînak
119
ji serhildan ii berxwedanên Kurdan da. Sedemên tekçiina
ii semeketina wan anî zimên.
-Lê, ev çend salên dawî ku li Kurdistana Bakur ew şerê
ku têye dayîn rewş û çarenûsiya gelê Kurd bi rengekî cuda
da dîyar kirin. Ev jî, ji tecrûbeyên dîrokiyên me tên.
Di derheqê konferansê de jî bi kurtasî van tiştan got:
-Pirsa Kurdan ne pirseke çandî ye, Ne pirseke koma

biçûk ya mirovan e. Ne pirsa çend kesên di zîndanan de ne. Yanî ne pirsa mafê mirovî ye. Pirsa Kurdan, pirsa azadiya 25milyon Kurd û serxwebûna welatê wan e. Em dibêjin hinek bi çavên ticaret û bazirganiyê xwe nêzikê pirsa Kurd dikin. Bila her kes bizanibe ku rizgariya Kurdan, divê bi îrada Kurdan be. Piştgiriya Kurdan, piştgiriya têkoşîna serxwebûn û azadiya Kurdan e. Prensîbên demokratiya rast jî, ji bo me ev e. Pirsa vê civînê, pirsa hevkariyeke rast e. Divê hevkariyeke rast û durust bê pêşkêşkirin.

"Di peymana Sewrê de dewleta Kurd jî hebû"

îsmet Şerîf Wanli, rexne li pêşnîyara deklarasyonê girt, ku tê de mafê çareniisiya Kurdan cîh negirtiye ii di şiina wê de mafê mirovî heye.

-Di peymana Sewrê benda 64-an de: " Heger Kurd doza dewleteke bikin divê em U dij demekevin".

-Min çav li deklarasyonê gerand, mafê mirovî girti ye. Pirsa Kurdan ne pirsa mirovî ye, pirsa netewî ye. Me di Konferansa Lozanê de jî, vê yeke da dîyar kirin. Divê mafê netewî bikeve deklarasyona vê konferansê.

120

"Li her perçeyî taybetiyên xwe yên cuda hene"

Şêx îzzedîn, U ser navê xwe, Komela ii Hîzbî Demokratî Kurd Rêxirabî Şoreşger axaft. Behsa kevneperestî ii nîjadperetiya rejîma îslamî kir. Got ku:

-Li her perçeyê Kurdistanê taybetiyên xwe yên cuda hene. Ji bo Konferansê pêşnîyariyên me hene. Divê ji bo Kurdan konferanseke navnetewî pêk bê. Li her perçeyî

Kurd heqê xwe bigrin. Ji Konferansê re dua dikim ii serkeftin dixwazim.

"Bi navê Ktudistanê
welatek heye"

Li ser navê 14 (1) rêxistinên Kurdistana Bakur I. Delen axaftineke kurt kir. Wî di axaftina xwe de, ji dema Lozanê heta niha ew zilm ii zordestiya ku liser Neteweyê Kurd heye anî zimên ii pêşnîyariyeke 8 xalî pêşkêşî konferansê kir:

-1Kurd ne wek mînorîtet, divê wek netewe bên qebiil kirin ii ev bikeve deklarasyonê.

-2Di platformên çareserkirina pirsa Rojhilata Navîn de, pêwîst e, ku Kurd jî bên temsîl kirin.

-3Divê komîsyoneke navnetewî bê damezrandin, ku ka kî wan çekên kîmyewî çêdike, difroşe ii bikartîne. Rejîma Iraqê li hember Kurdan çekên kîmyewî bikaranî, divê îraq ii ew fîrmayên ku çekên kîmyewî çêkirne ii firotine, tazmînata wê bidin Kurdan.

-4Di biryara Konferansa Ewlekarî ii Hevkariya Ewropayê de kêmkirina çekan, divê Kurdistana Bakur jî bigire nav xwe.

-5Ji bo temsîliya çavdêrî ya Yekîtiya Netewan ii ji bo niineriya daîmiya gelê Kurd di muessên navnetewî de, bUa xebat bê kirin.

121

-6Bila ordiya Tirk ji Kurdistanê vekişe ii îdara ewlekarî li Kurdistanê bê rakirin.

-7Ew çekên ku ji bo şerê Xalîcê, di riya NATO re çiine

Tirkiyê, bUa bi şiin ve bê şandin.
-8Ji bo birêvebirin ii taqîbkirina biryaran, bila komîteyeke çavdêr pêk bê ii di vê komîtê de Kurd jî hebiin.
(1)Kawa, Rizgarîvanên Neteweyên Kurdistanê, Tevgera Rizgariya Kurdistanê (TEVGER), Tevgera Sosyalîsta Kurdistanê, Partiya Karkerên Kurdistanê (KIP), RIZGARl, Platforma Demokratik ya Welatparêz û Şoreşger a Kurdistanê, Platforma Yekîtiya Ala Rizgarî, Partiya Demokrata Kurdistana Tirkiyê û Têkoşîna Sosyalîst.
"Yekgirtî û serketî bin"!
Asbjöm Eide (Oslo): Di derheqê Kiu-d ii mafê çareniis de ya girîng ew e, ku xelk bi xwe biryar bide. Ev otonomî, federasyon an serxebiin e. Mafê çareniis U ser daxwaziya gel, azadiya gel e.
Li Kurdistanê gelek faktor hene, ku mafê çareniis bêt stendin. Neteweyê Kurd yek netewe ye. Divê ev yek li ser qaniin û prensibên netewî be. Heger dewletek çêbikin çawan dikarin vî mafî bigrin? Encama mafê çareniis wek welateke serbixwe raste rast bi dewletê ve girêdayî ye. Ev mutlaq nîne. Heqê her neteweyî ye, ku çareniisiya xwe bi destê xwe bigre. Ev heqê Kurdan e jî. Di peymana Sewrê de jî, her çiqas ne vekirî bii jî, ev tişt hebii.
"Sîstema kevin ix ya nû"
Profesor Richar Falk (Stockholm): Niha dem hatiye ku Kurd mafê xwe yê çareniisî bigrin ii biparêzin. Doza Kurdan U Ewropa ii DYA baş nehatiye fam kirin. FUistînî

gelek hindik in, lê her kes baş dizane doz ii rewşa wan çi

ye. Di bin zordariya Saddam de xelkê Ewropî baş ji rewşa Kurdan agahdar biin. Armanc ii encama vê konferansê divê agahdariyeke baş bidin Ewropiyan, çapemenî ii sîyasetan.

Biiyera Xalîcê pirsa Kurdan guhart. Bush bi xwe got ku, "divê mirov li Rojhilata Navîn rêzgirtinê bide mafê mirovan. Ev nîzama cîhanê ya nû ye." Lê, gelo armanca wî çi ye? Gelo xelkê herêmê ji bo kara xwe bi kar bîne? Di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de, armanc, parvekirina Kurdistanê bii. Petrol hebii. Peymana Sewr ii Lozanê bidin ba hevdu; di Sewrê de mafê Kurdan hebii, lê, di Lozanê de rabii. Û welatekî nii - Tirkiye hat çêkirin. Niha jî, piştî şerê XaUce çi polîtika tên çêkirin? Du rojan berê Kamuran înan digotm, " dawiya welatê mezin li herêmê tên ii yên biçiik dest pê dikin." Ev girîng e. Hesabê Saddam têkçii. Gelo dê niha di herêmê de, rola Tirkiyê, Suriyê ii îranê çi bin?

Ez du tiştên nîzama kevin bêjim. Rewşek hat afirandin di navbera netewe ii dewletan de. Bi taybetî ya gelê Kurd. Ev jî ax e. Erd ii netewe probleman çêdUdn. Gelek kes baş nizanin nîzama dewlet ii netewan çi ye. Di polîtîka kevin de, dewlet dihatin zanîn. Lê, trajedya Kurd biibii esîr ii eserê dewletê. Dibêjin "Tirkiye dewletek e ii temsUê neteweyekî dike." Ji ber vê yekê dema mirov behsa Kurdan bike nabe. Lê, li gor qaniinên navnetewî dewlet hene. Niha jî dibêjin" dewlet ii netewe ne yek in." Me dît, neteweyên ku dewletên wan tunin, çi tên serê wan.. Pêwîst e, ew xwedî dewlet bin.

Sîstema kevin ii ya nii çi ne?
Berî krîzê sîstem bi hevdu re keti biin hemberiyê. Dema fêda DYA tê de hebe çek didin Kurdan. Çawan Iran ii îraqê berhev dan. Saetên Kissinger ên tarî hene, ku çi anî serê Kurdan.
123
Niha di vê navê de Tirkiye çima vê rolê dilîze? Gelo dixwaze Iraq ji navê rabe, an bi rastî ber bi guhartinên nii ve diçe?
Ji bo Kurd ii Filistîniyan dibe ku dewletên ne otonom derkevin holê...
"Aştî di mala min de nîne"
Dr. Mahmiid Osman: sîyaseta DYA ev e, ku pirsa Kurd di nav dewletên herêmê de hel bike. Her dema ku me pêwendî bi DYA dadarû, wan digot:
Beîê, belê, em we fam dikin, lê îhtiyaciyên me hene.
Em ji ber vê yelcê nikarin." Iranê di dema Şah de bi Tirkiyê re nedixwest, ku pirsa Kurd bê rojevê.
Piştî krîzê em carek din çiin Amerika. Dîsan gotin:
"Bes bi Saddam re promlemên me hene".
Çendek berê jî, em çiin konferansa Amerika, Madam Mitterand jî li gel me bii. Dîsan bi me re pêwendî danenîn. Bi tenê me pêwendî bi berpirsiyarê Mafên Mirovan re danî, lê ew jî paşê nehiştin.
Gelek caran em çiin FN. Gotin:
"Ev pirsa hundir e û divê dewlet wê bînin rojevê".
Ji me re gotin; "dewîetên ku têkiliyên wan zêde bi wan dewletên herêmê ve tune, bila ew pirsê bînin FN. Gotin

baştir ew e, ku hûn herin îzlandê. Ew dewleteke biçûk e û ji bo vê pirsê geîek di cîh de ye. Em çûn îzlandê û me wan dît. Gotin "baş e." Paşê em çûn Newyorkê, gotin " nabe. Amerîka gotiye hûn nikarin".

Em çiin ba sekreterê FN. Me derdê xwe jê re got:

"Bi hezaran penaberên me îi Iran û Tirkiyê hene. Birçî ne. Tazî ne û perîşan in. Ji wan re aîîkarî bikin. " Wî got; "Rast e. qanûnên FN û navnetewî hene. Em nikarin".

124

Em rabiin çiin rêxistina Koma Penaberan. Me ji wan re jî got; " wek Filistiniya, wek Afganistaniyan ji penaberên me re jî alîkari bikin. Statuya penaberiyê bidine wan" . Gotin; "na Tirkiye nahêle".

Baweriya min bi Tirkiyê tune. Lê, dibe ku qezenca wan hebe ii ber bi me bên.

Belê, rewşa niha hêviyê dide me. Lê, pereyê me tune. Niha piştî rewşa li welêt hinek sempatizanî çêbii. Niha pirsa me bii pirsa navnetewî. Piştî rewşa nii, em çiin Fransê. Wan ne raste rast lê, gotin "belê." Her weha Moskova jî, em çiin ii me bersivên pozîtîv girt. Me biryar da ku em pirsê bibin FNê. Parlementoya Fransê biryar girt ku pirsê bibe FNê. Ji serokê Fransê Mitterand pirsîn:

-Gelo /i deri pirsa Kurd aştî li Rojhilata Navîn çêdibe?

Wî got:

-Na. Aştî li mala min bi xwe çênabe. Bi jina min bimîne nahêle!

"ingilistanê di derheqê Kurdan de polîtîka xwe guhartiye"

Parlementera Partiya Karkerê îngilistanê, Ann Civyd behsa zilm ii zordestiya li ser Kurdan kir ii di derheqê polîtîka îngiUztanê ya niha de weha digot, an soz didan:

-Niha di polîtîka îngiliztanê ya nû de, di derheqê Kurdan de guhartin çêbûne. Di vî warî de hemû partiyên Ingiîiztanê bi hevdu re ne. Ez bawer im, ku îngiîiztan dê îi ser Amerîka jî tesîreke pozîtiv bike. Partiya me ji bo Kurdan dest bi xebatên baş kiriye....

125

Pêşkêşkirina raporên Komekî

Komîta konferansê ji berê ve biryar girti bii, ku hinek kes ii komikên xebatê U ser rewşa Kurdan raporan pêşkeşî Konferansê bikin. Li ser rewşa Kurdistana Iraqê Viola Furubjelke ii Omer Şêxmiis; ya Tirkiyê Maria Leissner, Şerefxan Cizîrî, Eşref Okumuş ii Anders Utas; ya îranê Bo Utas; ya Kurdên Sovyetê Cemşîd Heyderî ii li ser Kurdên mahacir jî Birgit Amman, Keya îzol, Omer Şêxmiis ii Olof G. Tandberg raporên xwe pêşkêş kirîn.

Deklarasyon û qaniînên navnetewî

Thomas Hammarberg li ser deklarasyona dawî agahdarî da. Ji niineran daxwaz kir, ku deklarasyonê weha formile bikin, ku li gor qaniinên navnetewî be. Û di organên navnetewî de bên qebiil kirin ii avuqat jî, wê bibin Koma Neteweyan.

Komên xebatê pêk hatin

Roja paşî, ji bo pêşniyarî ii daxwazên niineran xebatên komekî pêk anîn. Xebatên komekî weha hatin dabeşkirin:

-1Koma rêxistinên demokratîk U Ewropa;

-2Koma rêxistinên navnetewî li der;
-3Koma weşan ii çapemeniyê...
Her kom cuda civiya. Di nav xwe de biryar, daxwaz ii pêşnîyaran gotiibêj kirin. Û di dawî de, her koma xebatê rapora xwe pêşkêşî Konferansê kir.
Gotûbêj li ser deklarasyonê
Niineran li ser pêşnama (taslaxa) deklarasyonê dîtinên xwe anîn zimên. Xala li ser bêtir gotiibêj bii, xala ku "parastina mafê Kurdan ên mirovî" hû. Bi taybetî niinerên
126
rêxistinên Kurd yên polîtîk giraniya xwe danîn ii di şiina gotina "mafê mirovî" de "mafê çarenûsî" kirin xala daxuyaniyê)deklarasyonê). Xweza ev jî gaveke pêşketî bii. Taybetiya Konferansa Stockholmê ji xwe yek jî, ev bii ii ya din jî mirov giraniya partî ii rêxistinên Kurd bi awayekî vekirî didît.
Niinerên Konferansê piştî van guhartinan bi yek dengî deklarasyonê qebiil kirin û dawiya konferansê hat.
Pişti konferansê, di eynî cîh de, Kurdan di nav xwe de civîneke taybetî çêkir. Di vê civînê de, li ser pêwîstiya pêkanîna kongreke netewî rawestan ii pirsa kongreya netewî gotiibêj kirin.
PLATFORMA
MORAL Û ŞÊWRÊ
Konferansa Stockholmê bi niiçeyên xweş vebii. Dema li Kurdistana Başiir hêzên pêşmêrge, di Bereyî yekgirtî de, bi gelê Kurd re dibiin yek ii gav bi gav axa Kurdistanê ji rejîma Saddamê xwînrêj azad dikir, pêk hat. Ev serfirazî ii

pêşketin ji Kurdên niiner ii kesên amadekarê Konferansê re bii moraleke bilind ii xurt. Vê rewşa ha pirsa Kurdan li cîhanê aktuel kir ii anî rojevê.
Konferans di vê demê de bii platforma hevdîtina hêz ii kesên Kurd. Li ser rewş, polîtîka ii statiiya Kurdistana Başiir, di nav Kurdan de gotiibêj, şewir, dîtin ii daxwaz germ ii geş biin. Konferans ji Kurdan re bii platforma moral ii şêwrê. Di bingehê xwe de, Konferans ji nav çar dîwarên salonê derkete der.
127
Di dema civîna Konferansê de, rizgarkirina Kurdistana Başiir li seran serê cîhanê olan da ii di çapemeniya cîhanê de rêza yekemîn girt. Ji ber vê yekê Konferans di bin sîya wan biiyerên ku li Kurdistana Başiir dibiin, de ma. Ma ji xwe armanca Konferansê jî, ev bii ku pirsa Kurd di raya gştî ii çapemeniya cîhanê de aktuel bibe il bikeve rojevê. Dîsan ji ber van biiyerên Kurdistanê, gelek kesên polîtîkvan ii ronakbîrên Kurd nikaribiin beşdarê Konferansê bibin. Herweha ji aliyê beşdarbiiniyê ve jî sewiya Konferansê nizm bii. Dîsan mirov di vê mijarê de didît, ku pîvan ii prensîbên komîtê, di derheqê hilbijartina niineran de, kêmasî ii çewtiyan derdixistin navê. Ev prensîb di roja dawî de, hîn jî sist bii.
Di Konferanseke weha de, li ser navê gelek rexistinên Kurdan cuda cuda axaftin, carek din belavbiina Kurdan da dîyar kirin. Û ji ber vê yekê jî, eynî tişt dihatin tekrar kirin.
Di Konferansê de, bêdengiya Kurdên Rojhilat bala

mirov dikişand.
Di Konferansa Stockholmê de, bi daxwaz ii însîyatîva hêzên Kurdistana Bakur ii hinek niineran, çarçova daxwaz ii pêşnîyariyên Konferansa Stockholmê, ji yên berî firehtir ii pêşketî bii. Konferans ji çarçova mafê mirovî ii kulturî derket. Di nav xalên (nuqtên) deklarasyonê de mafê çareniisî cîhê xwe girt. Ev yek, ji bo rojên pêş, di platformê weha de, divê bêt parastin ii daxwaza dewleteke Kurd bêt kirin.
Divê em ji bîr nekin, ku her platformeke navnetewî, ji bo standina mafê neteweyê Kurd, geveke pêşketî ye. Em Kurd divê gavan bavêjin...
AmedTîgiîs
128
Deklarasyona Konferansa Stockholmê
Zordariya ku li ser ji 20 miîyon Kurdî bêtir heye, divê ji aliyê civaka cîhanê ve êdî neyê qebûl kirin. Ev tehdîdek e, li ser aştî û edlayiya Rojhiîata Navîn êrîş û destdirêjkirinên /f ser standartên mafên mirovî ye, ku bi peymanên navnetewî hatine tespît kirin.
Destdirêjkirinên li ser mafên mirovayî li Kurdistanê gelek salan pêk hatin û niha jî sîstematîk û bi berfirehî dom dikin: Giriinên sîyasî, êşkence, cezayên giran ên piştî mehkemekirinên xapînok û ne li rê yan jî qet bê mahkeme, "wendabûn, " cezayên mahkemên fewqelade, şerê kîmyewî, valakirin û wêrankirina waran, xwarin û wesîtên

jîyanê, înkara mafê ziman, edebîyat, muzîk û hebûna dîroka xwe, rewşa dijwar û nemirovayî yalikampên penaberan..!
Gelê Kurd tû caran jîyana demokrasiyê nedît. Xerabtirîn xwedî îdarekirinek bi qîmet nebû para wî. îraqê - welatê ku îi ser kaxezê soza awayek otonomiyê ji bo wan da - di riya zordarî û pêşkêşkirina karmendên xwe yên hefsarkêş re, ev peyman binpê kir.
îran, îrak, Suriya, Tirkiye û Sovyet hemûyan di demên cihê cîhê de, bi zanabûn hewldan ku di riya teşebûsa guhartina mîzana demografîk a herêmên Kurd re şexsiyeta netewî ya Kurd bibişêfin.
Heta ku ev bê edaîetî dom bike, dê tû aştiyeke rastîn îi Rojhilata navîn peyda nebe.
Konferans;
Daxwaz dike, ku hukimetên îran, îraq, Suriye, Tirkiye û Sovyetê Beyana Navnetewî ya mafên 129
Mirovî, herweha peymanên mafên mirovayî qebûî bikin û wan li Kurdistanê û herêmên din ên ku gelê Kurd lê dijîn, bi her awayî bi cîh bînin.
Konferans, bi taybetî ji van her pênc hukimetan daxwaz dike ku:
-Di demekî kin de koçkirina Kurdan û wêrankirina avayî, taîankirina mal û hebûnên wan rawestînin;

-Bi carekê de giriiyên Kurd yên sîyasî berdin, êşkence û cînayetan rawestînin;
-Riya vegera penaberên sîyasî yên Kurd vekin û hemû mafên wan ên hemwelatiyê garantî bikin;
-hemû dezgehên di nav hêzên polîs, emnîyet û eskeriyê de belav bikin, ku ew ji bo zordariya li ser geîê Kurd hatiye bikaranîn;.
-Sîstemên xwe yên dadgehî û qanûnî li gor standartên navnetewî yên mafên mirovayî reforme bikin;
-Zerara qurbanên îhlaîkirinên derbasbûyî yên mafên mirovayî tazmîn bikin;
-Mafê ziman û kultura kurdî, herweha mafê çapemenî û weşanê bi kurdî qebûl bikin û mafê zarok û ciwanên Kurd hene bi ziman, xwe hîn bibin û bixwînin;
-Rê îi bergirtina pêwendiyên navbera Kurdan îi ser tixûbên navnetewî bisekinin û dest bi hêsakirinê bikin;
-Daxwaz dike ku her ev hukimet mafê çarenûsiya gelê Kurd qebûl bikin, hewla guftûgoyeke li ser bi destxistina vî mafî bikin ku bi awayekî ku têkiliyên aştîdar, dualî û dilovanî di navbera Kurdan û civakên cîran de peyda bibin.
-Bangî hemû hukimetan dike ku îhlaîên
130
Kurdan li wan welatên ku ew lê dijîn ji ber

kişandine û dikêşin, di Konseya Mafên Mirovayî
ya Neteweyên Yekbûyî de berpêş bikin;
-Bangî hemû hukimetan dike ku bi xuriî bixebitin
ji bo bicîhanîna peymana normên navnetewî
ya li ser bikaranîna çekên kîmyewî;
-Bangt hemû hukimetan dike, ku doza Kurd-
mafên mirovayt yên kesên Kurd û herweha
mafê çarenûsî ya gelê Kurd - di insîyatîfa aştiya
Rojhilata Navîn a piştî şerê Xalîcê de bikin xwedt
par;
-Bangî Sekreterê Giştî yê YN dike, ku îê bikole
û pêşnîyar bike ku gelê Kurd û civakên din yên
bê dewlet çawan çêtirîn dikarin di karûbarên Neteweyên
Yekbûyî de bên temsîl kirin;
-Daxwaz ji hemû hukimetan dike ku
pêwendiyên li gel penaberên Kurd li ser bingehekî
însanî bin û mafên penaberiya wan jî, bi
qasî yên pênaberên grûbên din bin, ciddiyeta zordariya
li ser Kurdan a ku li welatên wan ê esîî bi
ser wan de tê, ii ber çav bigrin;
-Bangî Komîsyona Bilind a Neteweyên Yekbûyî
ya ji bo Mafên Mirovayî (UNHCR) dike, ku
beşdariyek mezin bide parastin û aîîkariya penaberên
Kurd ên Rojhilata Navîn, bi taybetî yên
Tirkiye, îraq, Iranê, bangî hemû hukimetan dike,
ku di vê meselê de piştgiriya UNHCRê bikin.
IS'ê Adarê
Pêşmêrge êrîşeke mezin bir ser bajarê Miisilê. Ji derî

Miisilê hemii bajarên Kurdistanê yên mezin rizgar biin.
Mesiid Barzanî li Bajarê Silêmaniyê bi milyonan re
131
mîtîngeke pêk anî. Li herêmê hemii dezgehên dewletê ketine destê Bereyê Kurdistanê. Li Kurdistana Başiir dewleta îraqê hildiweşe.

'19ê Adarê

Celal Talabanî li Şamê daxuyanîyek da, ku bi hemii hêzên oposîzyona Iraqê re, amadeye ku herin Kurdistanê ii di nav şer de hukumetekê saz bikin. Talabanî xwe bi çûndina Kurdistanê re amade dike.

'20ê Adarê

Celal Talabanî di sînorê Suriyê de, bi hinek serokên oposîzyonê ii hêzek pêşmêrge ve çii Kurdistana Başiir. Li gel wî gelek rojnamevan ii nûçegîhanên Ewropî jî çiin Kurdistanê.

'21ê Adarê

Talabanî bi heyeta xwe ve gehêşt bajarê Dihokê. Li Dihokê mîtîngek pêk anîn. Bi hezaran kes beşdarê mîtîngê biin. Talabanî di mîtîngê de axaft.

'22ê Adarê

Li gor niiçeyan, hêzên Saddam ên Parastvanên Komarî li Başiir bi barbarî Şuyan dUcujin ii serhildana Şîîyan U ber têkçiinê ye. Ji bo êrîşkirina Kurdistanê jî, xwe ji şereke gelek giran ii dijwar re amade kirin. Ji bo êrîşa mezin ii dijwar Kurd çeperên şerê dikolin. Kozikan çêdikin. Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal pişti vegera Sovyetê, îro jî çii Amerikayê.

'23ê Adarê
Saddam giraniya xwe da eniya Kurdistanê. Şer di navbera hêzên pêşmêrge ii yên Saddam de dom dike. Lê, ji % 90
132
axa Kurdistanê di bin kontrola pêşmêrge de ye.
Turgut Özal, li Camp David li ser pirsên Rojhilata Navîn bi Bush re civînek pêk anî. Yek bi naveroka civînê nizane. Li gor texmînan pirsa Kurdan ya sereke ye.
'24ê Adarê
Bush ii T. Özal piştî hevdîtinê presskonferansek pêk anîn. Bush got em mudaxeleyê karê nav îraqê nakin.
Niiçegîhanê CNN ê ji Turgut Özal pirsî:
-Hiin îraqeke bê Saddam dixwazin?
Bersiva Turgut Özal:
-Em mudexela hundirê Iraqê nakin.
Çapemeniya cîhanê ii ya Tirkiyê bi xwe nivîsandin, ku "Turgut özal mesaja Saddam ji Bush re birîye ku Bush bihêle ku balafir û helîkopterên xwe li dij Kurdan bikarbîne. Bush û Turgut özal li ser wê pêşniyariya Saddam îi hevdu kirine".
'25ê Adarê
Şer di nav hêzên pêşmerge ii Saddam de dom dike. Ji ber ku rojnamevan ii niiçegîhanên bîyanî li Kurdistanê ii îraqê tune ne, kes baş nizane ka rewş çi ye. Her du alî jî dibêjin, ango hem Kurd ii hem jî îraq dibêjin ku " em bi pêş ve diçin. Hêzên me bi ser dikevin".
'26ê Adarê
Li gor CNN hêzên Saddan êrîşeke mezin birin ser

bajarê Kerkiikê ku di bin kontrola Kurdan de ye. Şerekî gelek dijwar di nav hêzên Kurd ii Saddam de heye.

(*)Paşê dîyar bû ku di 27'ê Adarê de Kerkûk bi paş ve ketîye destê hêzên Saddam(.

133

Li gor niiçeya îranê ÎRA hêzên Şîî xwe berhev dikin ii dixwazin êrîşekî mezin bibin ser bajarê Bexdayê.

Kroll CBS TV lêkolînek çêkir û li gor vê lêkolînê Saddam Huseyîn bi wesîta zirbirayê xwe Barzan el Tikritî 10milyar dolar pere li ser hesabê xwe derxistiye der ii birîye Amerîka. Barzan el Tikriti niha li ser navê Iraqê li Cenevrê, di Buroya Koma Netewan ya Mafê Mirovî de niinerê Iraqê ye. Ev pereyên wî niha li ser navê birayê wî di şirketên Amerîka de ne. Ev pere ji %5 petrola Iraqê hatiye girtin. Herweha Saddam di dinyayê de dewlemendê yekemîn e.

TRAJEDIYA KURD

'27ê Adarê

Di riya Miisil ii Dihokê de, di navbera Kurd ii hêzên Saddam de şerên dijwar pêk tên. Herdu aU jî, dibêjin "em bi serketin". (Hêzên Saddam çekên giran ii diirmenzîl bikar tînin.

'28ê Adarê

Şer berdewam e. Kes baş nizane ka li îraqê rewş çawan e. Lê, Saddam hemii çekên xwe yên giran yên ku nikaribii li dij hêzên Hevkar bUcar bîne, U dij Kurdan bikar tîne. Li gor Bexdayê paqijkirina Kurdan çend roj digire. Hema hema li Kurdistanê kontrolê girtiye destê xwe.

Kurd, îraqê bi derewan îtham dikin ii dibêjm "şer berdewam e û di bin kontroîa me de ye".

134

'29ê Adarê

Şer her berdewam e ii tii kes nikare ji Kurdistanê ii îraqê niiçeyên rastîn bigire. îraqê bi tevayî serhildana li Başiir ya Şuyan şikestandiye ii hemii giraniya xwe daye Kurdisatanê. Hêzên pêşmêrge di berxwe dide. Niiçegîhanên Rojava dibêjin plana Saddam ew e, ku ji Kerkiikê heta Zaxo şerîta sînorê Kurdistanê ii Suriyê bigire. Heger hêzên Saddam riya Suriyê li Kurdan bigre, êdî Kurd nikarin alîkariya xwarinê ji derve bigrin ii dê di çend rojan de teslîm bibin. Ji ber vê yekê ordiya Saddam a Parastvanê Komarê ber bi sînorê Suriyê ii Tirkiyê ve diçin.

'30ê Adarê

Saddam dest bi karanîna balafir ii helîkopteran kiriye. Li dij Topên diirdirêj bi kartîne. Çekên kîmyewî ii napalm bi kartîne. Scud davêjin bajarên Kurdistanê. 11 skiid bi tenê avêtiye bajarê Kerkiikê. Şer bi dijwarî di nav hêzên Saddam ii pêşmêrge de dom dike. Amerika û hêzên Hevkar ji bo bikaranîna balafir, helîkopter ii çekên kîmyewî Saddam re çavên xwe digrin. Çendek berê, dema Saddam balafirên xwe bi kar anî, Amerîka ji wan balafiran dudoyan xist ii îraqê tehdît kir ku "heger ew balafir ii helîkopterên xwe bikar bîne, dê Amerîka hingê peymana şer a rawestandinê ji navê rabike ii dîsa dest bi şer bike". Lê, Saddam niha balafir, helîkopter ii scud U dij Kurdan bi

kar tîne ii Amerîka ii hevalbendên xwe jê re tamaşevan
in. Bi satelîtan lê temaşe dikin.
'31ê Adarê
Li gor niiçeyan hêzên Saddam bi balafir ii helîkopteran
li Kurdistanê gav bi gav pêşve diçin. Hêzên Saddam bi
topên diirmenzîl ii sciidan Kurdistanê wêran dikin.
135
Bajarê Kerkiikê bi paş ve ketiye destê hêzên îraqê. Êrîş
dibin ser bajarên din. Li gor niiçegîhanên CNN, li
Kerkiik, Hewlêr, Silêmaniyê kevir li ser kevir nemane.
Saddam ew teknîka ku nikaribiin li hember hêzên
Hevkar ii Amerîka bikarbîne, li dij Kurdan bi kartîne.
Bajar hema hema U ber ketinê ne. Xelk ji bajaran derdUceve.
Bajar ji diixan ii agir nexuyane. Hêzên pêşmêrge, li
136
hember çekên modem, kîmyewî ii bîyolîk bi qehremanî li
ber xwe didin.
l'ê Nîsanê
Beyanî (sibehê zii) berey ê Kurdistanî hemii rêxistinên
xwe yên Ewropa agahdar kir, ku ji ber êrîşên balafir,
helîkopter ii scudên Saddam bi hezaran xelkê sivîl bajar ii
gundê xwe hiştin ii ber bi tuxiibên Tirkiyê, Suriyê ii îranê
ve direvin. Qasî milyonek kes ji malên xwe derketine ii li
rê ne. Ji ber neqetilkirina xelkê sivîl, pêşmêrge xwe ji
hinek bajaran paşve kişand. Li derê bajaran şer dom dike.
Ji bo pêkanîna raya giştiya cîhanê ii bi taybetî ya Ewropa,
Kurdên li derê welêt divê xwe bi hemii îmkanên xwe ve
amade bikin.

Rêxistinên Kurd ii Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê, bi hevdu re komîteya çalakiyan pêk anîn ii dest bi çalakiyan kirin. Xwepêşandanek li hember konsolosxana Amerîka ya li Stockholmê pêk
anîn. Qasî 700 kesî beşdarî xwepêşandinê biin.Xwepê şandanan xwestin ku hêzên Hevkar, Amerîka ii Koma Neteweyan qetlîama ku li Kurdistanê dibe, mudaxeleyê wê bikin. Welatên Hevkar ii Koma Neteweyan divê li ser soz ii peymana xwe rawestin ii U gor peymana ku di nav hêzên Hevkar ii îraqê de pêk hatibii, divê îraq balafir, helîkopter, scud ii çekên kîmyewî ii bîyolojîk li hember Kurdan jî, bikar neyîne. Bila Koma Neteweyan ii hêzên Hevkar rê nedin bikaranîna wan çekan. Pêşî li qetlîama faşîstê Bexdayê bigrin.

137

Li ber konsolosa Amerîka

Ji Federasyonê re telefon dikim. Kirîv, berpirsîyarê Berbangê, tê ser telefonê. Dibêje, heger li ber sefaretxanê tiştek interesant hebe, ji bo Berbangê binivîsîne.

Li ser daxwaza Enîya(bereyê) Kurdîstana Iraqê, Kurd ji şeva çiinê da li ber sefaretxana Amerikayê riiniştine. Gava ez diçun wir saet U dora 18.00'an e. Êdî roj diçe ava. Li ser Stockholmê ewrên baranê hêdî hêdî berev dibin. Pelên ji daran weşyane erdê ii li wir komî ser hev biine. Swêdî, di nav otomobîlên xwe yên nerm ii germ da, bi çavên şaşmayî li porreşên li ber dîwêr, li pankartan wan dinêrin ii derbas dibin.

-Selamuneleykum!

-Eleykumselam.
Bi qasî deh kesên, wisa xuya ye, ku ji Kurdîstana başiir in, li hember sefaretxana Amerîkayê, li ber dîwarê baxçeyekî, di nav xwe da dipeyîvin. Silava min radigrin ii axaftina xwe didomînin. Li ser çend lewhên tirafîkê ii şîşên dîwarê bêxçe, çend alên reş ii çend pankart hatine daliqandin. Gava ba tê, alên reş piçekî pêl didin ii pişt re, weke zarokên stiixwar, bêhereket dimînin.
Mirovên din çiine mal, dê sibehê bên. Ez rismên çend pankartan digrim ii ji wir diçim. Tarîyek sivik xwe berdide ser Stockholmê.
Bi hezaran kîlometir ji Stockholmê diir, li Kurdîstana başiir, bi hezaran Kurd, zar ii zêç, pîrek ii peya carek din ketine riya macîrtiyê.
Hevkar (Mutefîk) li Saddam rabiine xezebê. Ordîya Saddam ji hev xistin. Lê belê Saddam ji holê ranekirin. Hesabên wan her çawa bii, hat guhertin. Saddam li cîyê xwe ma. Ev Saddam e,ku bi Iranê nikare, bi Hevkaran nikare, lê bi Kurdan dikare. Kurdên sivîl ii bê çek.
Ev çend roj in, ordîya ku di destê Saddam da maye, bi

ser bajarên Kurdîstanê agir dibarîne. Bi hezaran Kurdên sivU, ji ber tirs ii xezeba Saddam bajarên xwe yên bav û kalan terk dikin. Zarokên xwas, pîrekên bi betena kiras ii kal ii pîrên bêteqet, di bin bombe ii gulebarandina helîkopteran de ber bi tixiibê (sînorê)Tirkîye ii çiyayên Kurdîstanê ve duneşin. Dimeşin ii dimrin. Ji birçîbiinê, ji sermê, ji nexweşîyê ii ji napalmên Saddam dimrin. Yên

ku xwe ji bombeyên Saddam xelas dikin ii xwe dighînin ber tixiibê Tirkiyê, vê carê ji aU eskerên Tirk ve gulebaran dibm.
Li gor niiçeyan, heta niha 300. 000 kes U ber tixiibê Tirkîyê kom biine. Tirkiye wan bemade hundk, eskerên li ber tixiib, ji bo ku kes tixiib derbas neke, gulan bi ser serên wan de dibarînin. Herweha carek din Kurd li ber çavên dinê, li ber çavên hemii mirovên bê namiis ii bi namiis macir ii qetil dibin. Hawara Kurdan li esmanan diçerqe, olan dide. Lê, ne deng e ii ne hes e. Deng bi paş ve, li xwedîyê xwe vedigere.
Sibetirê, roja 2'ê Nîsanê carek din diçun ber sefaretxana Amerîkayê. Endamên Komela Jinên Kurd dest bi grewa birçîbiinê kirine. Penc- şeş endamên Komelê, li kêleka rê, li hember konsolosa Amerîkayê, li ser erdê şil riiniştine, di grewa birçîbiinê da ne. ZUan, endama Komîta Karger a Komela Jinan, ew jî U wir e. Dibêje:
"Ger tu ji min bipirsî, divê me Amerika ji bo durûtiyê protesto bikira. Lê, em nuha îi vir in û dixwazin nîşan bidin ku pîrekên Kurd, di bin her şert û rewşî de dê îi ba xelkê xwe cî bigririn" .
Grewa wan dê çend rojan bajo ne dîyar e. Lê, du rojan carek dê penc endamên wan bi dor grewê bimeşînin.
-Saddamê faşist ii qatil!
-Alîkarî ji bo Kurdan!
-QetUama Kurdan bidin sekinandin!
Bi dengên sloganan re mirov li wir komê ser hev

mij:n:f-w:fişot
TOSSDAG4AP$lll 1991
ScKMaiHt iMrd pa barnen
B
■ ■Hon»rli«a0«»Satlda(r,s sag forîvwaix ogor,
tieantalsonar. Inansagetlanc!. skrackwsochsmarîanstigdb
Siî.''îîS?fiSr ^ ^*^ Vi s^ stni ha,- so-n'rar sa
îîîîi'î?^"!'*?."*'"*' uWerna'aa m Oe ■ne ortadi?
■JÎ^'^5Sl°*i'*** ^' 9'«'» "»> f»« twn sa-Sa
i^nap*no(fer och stympade naaetmmark-.«a?î«va SaSaMafc.
140
li xaniyê sefaretxanê ye. Di hundirê çavên wan de nîşanên
kîn, qehr ii hêvîyê li hev piçikî ne. Qehrek giran ii kiir, di
nav çavên wan de ii li ser riiyê wan diçe ii tê. Yên ku nii
tên, bêdeng derbasî nav koma mirovan dibin ii dest bi sloganan
dikin. Di destên gelekan de cixare hene. E>iixana
cixarê hêdî hêdî bi hewa dikeve, bi qasî çend saniyan,
weke mirovê ku, nizanibe bi ku de biçe, li ser komikê
digere, piştre wendadibe.
Şev nîvê şevê ye. Naxwazim rakevim. Heger bixwazim
jî nikarim. Gava zarokên xwas ji ber xezeba Saddam
xwe U çol ii çiyan dixin, gava pîrekên Kurd U ser erdê şil,
di nav cil ii paçan de grewa birçîbiinê dom dikin, kîjan
Kurd dUcare bi reheti, bê kul ii keser rakeve.
Saet di Ol'ê de xwe digihînim ber konsolosxana
Amerîkayê. Xort ii pîrekên delal ii dilşewiti xwe li erdê
dirêj kirine. Heger yekcama, xwe nelivînin, mirov dibêje
qey ew mirî ne. Ji ber bataniyan ii kumên li serên wan,

mirov nizane kî kî ye. Xwenga min jî di nav wan de ye, lê belê, nizanim kîjan e. Ronahiya li der ii dora wan car car dide riiyê wan. Hevalekî li wir, dibêje xwenga te va ye li wir e. Bi tiliya xwe nîşan dide. Silavê li xwenga xwe ii çend pîrekên din dikim. Dibêjin:
-Ji me ra tiştek ne lazim e. Em naqefilin.
Çend çilkên baranê dikevin. Baran bibare halê wan xirab e. Ji ber ku çadira wan tune. Polîsên ku ji bo grewa birçîbiinê destiir dane wan, destiira çadirvekirinê nedane. Divê grewa birçîbiine, di bm ba ii baranê de bidomînin. Ji wan xatir dixwazim ii ji wir bi rê dikevim. Ji ber qamyonekê derbas dibim, du hevalên Kurd di nav qamyonê de bi termosên çay ii qehwê ve mijiil m. Yên din jî pîyasedikin.
Xoito
141
'2.ê Nîsanê
Kurdan li seran serê Ewropayê dest bi meş, mîtîng ii grevên birçîbiiniyê kirin. Li Stockholmê Komela Jinan li ba konsolosa Amerîka dest bi greva birçîbiiniyê kir. Gelek komele ii kesên din jî beşdarê çalakiyên birçîbiiniyê biin. Bi sedan kes bi şev ii roj U ba Konsolosa Amerîka civiyan. Kon vegirtin. Ji bajarên din Kurd hatin Stockholmê. Hema hema her Kurdekî dest ji kar ii mala xwe berda ii şev ii roj li ba Konsolosê beşdarê çalakiyan bii.
Televîzyon ii radyoyên cîhanê dest pê kirin niiçeyên U ser Kurdan di rêza yekemîn de dan. Ew Kurdên ku ji ber barbariya Saddam tengezar ii derbeder dibiin, fotografên

wan hatin ekranên TV ii riipelên rojnameyan.
Bush di tatîla xwe ya Paskalyê de bii ii masî digirt.
Niiçegîhanên TV qetlîama Kurdan jê pirsîn. Bê dil bersiv da ii got:
-Me eleqeder nake. Ew karê nav îraqê ye. Em mudaxeîa nav îraqê nakin.
'3ê Nîsanê
Li Stockholmê, Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê, li Stockholmê, li dij konsolosxana îraqê meş ii mîtîngeke protestoyî pêk anî. Bi hezaran kes beşdarê meş ii mîtîngê biin. Li ba Kosolosxana îraqê çend xortan xwestin êrîş bibin ser konsolosxanê. Şer di nav polîs ii wan kesan de derket. Polîs bi hesp ii kiiçikan êrîşî beşdaran kir. Gelek kes birîndar biin. 33 kes ji aliyê polîs ve hatin girtin.
Li ba Konsolosxaneya Amerîka greva birçîbiiniyê dom kir. Bi hezaran Kurd ii Swêdî birçiyan zîyaret kirin ii gul dane wan ii piştgiriya xwe dîyar kirin.
Di eynî rojê de, li Çekoslovakyê jî, li dij konsolosxana îraqê meşek ii mîtîngek pêk hat.
Federasyona Komeleyên Kurdistanê, Hêzên sîyasî yên Kurdistanê ii Komîta Parastina Mafên Kurdan li Swêdê di
142
nav xwe de komîteyeke çalakîyan pêk anîn ii dê ji vir şiin ve, ev komîte çalaMyan bi plan ii program bimeşîne.
'4ê Nîsanê
Komek Kurd bi çek korisolosxana Belçîkayê dagîr kirin. Personalên wê dîl girtin. Ala îraqê daxistin ii ala Kurdistanê dakişandin ser konsolosxanê.

Kurdan li Londrayê meş ii mitîngeke çekirin. Ji jin ii zarokan komek, serokwezîra kevin Margereta Theacher zîyaret kirin ii pişgirî jê xwestin. M. Theacher, wan qebiil kir ii soz da ku ew dê bi hukimeta îngiliztanê re têkUiyan deyne, ji bo alîkariya Kurdan.

Li Elmanya li dij konsolosxana îraqê meşek çêbii. Konsolosê bi çekên otomatîk meşvanan gulebaran kir. Kuştin çênebii. Gelek Kurd ji aliyê poUs ve hatin girtin.

Li Amerîka biiyereke mezin çêbii. Li ba Qesra Spî mîtîngeke pêk hat. Bêdengiya FN (Koma Neteweyan) ii Amerîka hat protestokirin.

Dewleta Fransê pirsa Kurd bir Koma Neteweyan.

Tirkiyê ii Swêdê xwestin piştgiriya pêşniyariya Fransê bikin. Di civîna FN de Sovyet, Çîn ii Kuba, Hîndistan ii Zimbabwe li dij pêşnîyariyê derketin. Pêşnîyarî nehate qebiil kirin.

Senatoya Amerîka rexneyên tiij ii dijwar li Bush girtin. Li dij tewrê Bush muxalefet bi hêz bii. Bush, di TV de axaftinek kir ii gotinên xwe yên berê diibare kir:

-Em nikarin mudaxeleyê nav îraqê bikin. Ev lcarê wan yê hundirî ye.

Rojnamevanê Kurd Eşref Okumuş ii fotografvanê

143

Norveçî Georg Kristiansen di dema rizgarkirina bajarên Kurdistanê de, di riyên îllegal de çiibiin Kurdistanê. Herdu ji Kurdistanê vegeriyan Swêdê. Di rojnameya êvarê Aftonbaldet de, li ser Kurdan dest bi weşandina fotograf ii nivîsaran kirin. Aftonbladet, di riipelên yekemîn

de, fotografên zarokên birîndar ii seqet pêşkêş kir ii 3 roj li duv hev dom kir.

144

PIRSA KURD DI KOMA NETEWEYAN DE

'5ê Nîsanê

Koma Neteweyan, Pirsa Kurd dîsan girt rojeva xwe. Di pêşnîyara Fransê de guhartin çêkirin. Naverokê hîn jî nerm ii vala kirin. Bi tenê îraq divê êrîşê ser ew kesên sivîl ii bi taybetî yên ku di rê de, ji ber rejîmê direvin neke. Di nav 15 dewletên endam de dengdan çêbii. Kuba, Yemen û Ztmbwe U dij derketin, Hîndîstan ii Çin bê deng man. Cara yekem pirsa Kurd di Koma Neteweyan de hate gotiibêj kirin ii biryar li ser hat girtin.

Li Wîyanê, li dij îraqê meş ii mîtîngek pêk hat. îraqê protesto kirin. Kurt Waldheim jî, Rejîma Saddam bi tiindî suçdar kir.

Li seran serê Elmanyayê Kurdan dest bi xebatên protestoyî kirin ii têkiliyên xwe bi rêxistinên navnetewî yên polîtîk ii humanîst re geş kirin. Li Bonn ii Hamburgê gelek meş ii mîtîng pêk hatin. Xaniyê Xaça Sora Hamburgê hat îşgal kirin. Xaça Sor soz da, ku 500.000 mark ji bo alîkariya Kurdan dê bişêne.

Li Cenewrê Kurdan li ba KN (Koma Neteweyan) meş ii mîtîngeke protestoyî pêk anîn. Li Bajarê Bemê jî meşeke girsî çêbii.

Li bajarê Warşowê, xwendekarên Kurd ii dostên Kurdan ên Polonî, li dij rejîma îraqê meşeke protestoyî pêk anîn ii ji hukimeta Polonyayê daxwaza protestokirina

rejîma îraqê kirin. Di 6'ê nîsanê de, parlementoya Polon
yayê ii Wezereta Kariibarê Derveyî ya Polonyayê bi daxuyaniyek
rejîma îraqê, bi qetilkirina Kurdan siicdar kir.
Xwendekarên Kurd li Sofyayê 5 rojan ketin
xwepêşandana birçîbiiniyê. Li dij rejîma îraqê qasî 40
hezarî îmze berhev kirin.
Folk Partiya Swêdê, pêşnîyarî ji parlementoya Swêdê re
145
bu", ku pirsa Kurd wek ya netewî bibe KN.
Li Amerîka li Qesra Spî ii li derê wê opozîsyoneke
mezin ii berfireh U dij îdareya Bush çêbii. Di pirsa Kurd ii
îraqê de rexneyên tiij li Bush girtin. Bush ket tengasiyê.
Piçek xwe guhart. Ji bo aUkariyê biryara 60 milyon kronî
da. Soz da, ku dê, di hewa de pireyek pêkbîne ii xwarin,
vexwarin ii cil ii bergan bigîhîne Kurdistana îraqê, ew
cihên ku penaber li wir in.
Li Swêdê li bajarên Stockholm, Göteborg ii Uppsalê
grevên riiniştinê, meş ii mîtîng her berdewam dikin.
'6ê Nîsanê
Pêşniyariya Fransê hat guhartin ii naveroka wê hat
vala kirin. Pêşnîyar weha hat formUe kirin: "Divê îraq li
ew kesên ku ji ber şer direvin bombe neke..." bi şêweke
weha dîsan hat rojeva KN. Dîsan Kuba, Yemen û
Zîmbawe li dij derketin ii Çîn û Hîndistan bêdeng man. Ji
15endamên daîmî 10-an ji pêşniyarê re gotin "belê." ii hat
qebiil kirin.
NATO li Bmkselê civiya ii Rejîma Saddam bi tiindî
protesto kir ii ji KN xwest, ku qetlîamê bide rawestandin.

Derbeder ii penaberên Kurd ber bi sînorên Tirkiyê ii
Iranê ve direvin. Leşkerên Saddam bi helîkopteran li ser
wan gulebaran dikin. Zarok ii kal ii pîr di rê de dimrin.
Sar e. Berf dibare. Gel tazî ii birçîne. Ji birçîbiinê ii sermanan
di rojê de, bê hejmar dimrin. TV yên cîhanê hema
serê her saetî penaber ii derbederên Kurd nîşan didin.
Mirî, nexweş, seqet ii zarokên birçî....
Kurdan U peytextê Fînlandyayê, U Helsînkiyê li dij konsolosxana
îraqê meşek çêkirin. Kurdek xwest ala îraqê ji
dîrega konsolosxanê daxe ii ya Kurdistanê bikşîne. Personalên
îraqê bi çov ii çekan êrişê Kurdan ku-in. Şer derket.
Li Elmanyayê Komîta Kurd, ERNK ii ji çepên Tirk

komîtekî çêbii. Komîtê meş ii mîtîngek pêk anî. Di meş ii
mîtîngê de qasî 3000 kes beşdar biin. Herweha li bajerên
Bonn, Berlîn ii gelek cîhên din meş ii mîtîng çêbiin.
Li seran serê Elmanyayê MEDICO INTERNATIONAL û
komîteyên din, bi hevdu re, bi alîkariya radyoyê postgiro
vekirin. Pere, derman, kinc ii betaniye berhevldrin.
Parlementerên Kurd Ahmed Tirk, Mehmed Alt Eren û
wezîrê berê Şerefedîn EIçî, ji Tirkiyê frîn ii çiin Amerîka, li
ba xaniyê KN dê 3 rojan bikevine greva birçîbiiniyê. Parlementerên
partiya HEP jî, li Tirkiyê li ba parlementoya
Tirkiyê, li Ankarê ketin greva birçîbiiniyê.
'7ê Nîsanê
Papa li Vatîkan daxuyaniyekê da ii di daxuyaniya xwe
de kuştina Kurdan protesto kir ii ji cîhanê alîkariyê
xwest.

Bi berbanga sibehê re, li Stockholmê qasî 40 Kurdî
avêtin ser konsolosxana îraqê. Agir berdan xaniyê konsolosxanê
ii pencere ii dergehên wê şikandin. Ji konsolosxanê
bi çekên otomatîk li Kurdan agir barandin. Kes
nehat kuştin. 34 Kurd ji aliyê polîsê Swêdî ve hatin girtin
ii wan dan mehkemê.
Komîta Mafê Kurdan li Swêdê U Stockholmê meş ii
mîtingeke şînî pêk anî. Meşa şînê saet di 13-an de U Humlegêrdên
destpêkir. Ji 5000 î bêtir Kurd û Swêdî bi cil û
bergên reş beşdarê meşê biin. Li semta Kungstragdrden
mîtîngeke gelek mezin pêk hat. Di mîtingê de parlementerê
Partiya Kesk Per Garton, ji Partiya Çep Brit, ii
dengbêja Swêdî ya bi nav ii deng LUI Lmdfors ii keşîşekî
Swêdî axaftin. Wan di axaftinên xwe de piştgirîya xwe dan
dîyar kirin. Artîstê Swêdî yê navdar Gösta Ekmen mîtîngê
îdare kir.
Mesiid Barzanî ii Celal Talabanî, ji Kurdistanê, ji dew-
147
leta Swêdê re telgrafek şandin ii alîkarî ii pişgirtiya wan
xwestin. Ev telgraf di mîtîngê de jî hat xwendin.
Li gor ajansên dinyayê heta îro qasî nîv milyonî Kurd
derbasê Iranê biine ii hîn koçbarî ii rev dom dike. Qasî
150.000kes jî derbasê Tirkiyê biine ii qasî 300.000 kes jî, di
sînorê Tirkiyê de ji aliyê eskerên Tirk ve hatine rawestandin.
Tirk bi teqandina çek wan didin rawestandin.
Wezîrê Kariibarê Derve yê Amerîka, Baker ji bo
çareserkirina pirsên Rojhilata Navîn ii penaberên Kurd
çii Tirkiyê.

'8ê Nîsanê
Wezîrê Kariibarê Derve yê Amerîka J. Baker bi helîkopterê frî qeza Hekariyê Çelê (Çukurcayê) bi çavên serê xwe rewşa penaberên Kurd dît. Baker di vegerê de li Dîyarbekir presskonferansek çêkir ii got:

-Ev feleket e. Tirkiye û Amerika nikarin ji bin vê rewşa penaberên û derbederên Kurd derbikevin. Divê hemû dinya alîkariyê bike.

Li Bmkselê endamên Bazara Aboriya Ewropayê (EG) civiyan. îngiliztanê di derheqê Kurdan de pêşniyariyeke bi çar madde pêşkêşî civînê kir:

-1Li Bakurê îraqê herêmeke cografî ji bo Kurdên penaber bêt dîyarkirin. U penaber divê li wir bi cîh bibin, neçin Tirkiyê û Iranê.

-2Bazara Ewropê 180 milyon dolar bi lez û bez bigihîne penaberan.

-3Li ser rejîma Iraqê ambargoya çek bêt domandin.

-4Or^ana Yekttiya Rojavayê Ewropa li ser vê pirsê bicive. U KN heyetekê bi îez û bez bişêne herêma penaberên Kurd. Ji bo derengmayînê rexne li Sekreterê giştiyê KN hat girtin.

148

îraqê, biryara Bazara Aboriya Ewropê mudaxela hundirê xwe dît ii li gel KN wê biryarê protesto kir.

Parlementerên Kurd Ahmed Turk, Mehmed Alî Eren ii Wezîrê kevin Şerefetin EIçî, dawî dan greva birçîbiiniya xwe ya li ba xaniyê KN li Amerîka. Alîkarê sekreterê Giştiyê KN wan ji bo hevdîtinê qebiil kir.

Swêdê, ji bo penaber ii derbederên Kurd biryara şandina 40milyon kronî da.

Rojanamevanê Kurd Ferda Turan, xwe gihêştandibii nexweşxanên Suriyê yên ku li nêzî sînorên Kurdistana îraqê ne. Bi birîndarên Kurdên Kurdistana îraqê re hevpeyvîn çêkiribiin ii fotografên birindaran kişandibii. TV'a Swêdê, ji wan hevpeyvîn ii wênan perçek nîşanda.

Daxuyaniya Civîna Luksemburgê ya welatên Civata Aborî ya Ewropa (CAE(

Welatên, endamê Civata Aborî ya Ewropa (CAE) di 8-ê Nîsanê de, li Luksemburgê civiyan.Li ser rewşa başiirê Kurdistanê gotiibêj kirin ii biryar girtin. Bi tawreke giştî serokkomar, serokwezîr ii wezîrên derveyên beşdarê civîna Luksemburgê daxuyaniyek belav kirin. Herweha noxteyên ku di daxuyaniyê de cîh girtine wekî pêşnîyar, ji bo qebiilkirinê birin Komîta Ewletî ya Yekîtiya Netewan:

"Li îraqê, /i ser axa Kurdan, ji bo bi miîyonên insanên siwîl ên ku ji ber zordariya Saddam reviyane ber bi sînorê Tirkiye û Iranê de pêwîst e. Heremên Ewletiyê bêne sazkirin. Ew divê ji aliyê Yekttiya Netewan ve bê parastin.

*Mafên netewî yên Kurdan pêmst e bê qebûl kirin.

149

*Penaberên Kurd pêwtst e, ji bo ku bikaribin vegerin ser erd û malên xwe garantî bigrin.

*Embargoya aborî, li hemberê îraqê pêwîst e dom bike, heta ku îraq, van noxtên jorîn pêk bêne.

Ev biryarên Civata Aborî ya Ewropaya ku ji 12 welatan pêk tên, hat birêkirin ji Komîta Ewletî ya Rêxistina

Yekîtiya Netewan ji bo munaqeşe ii biryargirtinê. Her weha CAE nerazîbiina xwe pêşberê êrîşên îraqê li ser xelkê siwîl ê Kurd anî ziman ii diyar kir, ku amadeye bi alîkariyek xurt a insanî rabe. Ji bo vê çendê wekî destpêk, birêkirina alîkariya pêwîstiyên yekem ii dermanan ji bal welatên endam hate qebiil kirin. Rêya qebiilkirina biryarên nii li ser babetê vekirî hat hiştin, heta pirs bê çareserkirin. Girêdayî wê di Civîna Bmkselê de, ya ku pişti ya Luksemburgê hate bi dar xistin, Biryarek nii li ser pirsa Kurd hate girtin. Di biryarê de tê da xuyanîkirin, ku pirsa Kurd pêwîst e ji aliyê dewletên ku Kurd lê dijîn ve bi awayekî demokratîk bê girtin. Mafê Kurdan ji bo otonomî li ser axa ku ew lê dijîn hebe. Di biryarê de tê gotin, ku "ji derê vê çareserkirina pirsa Kurd nîne." Li hemberê vê biryara CAE wezareta derve ya Tirkiye nerazîbiina xwe anî zimên ku Civata Ewropa bi pirsên hundurî yê welatan ve mijiil dibe.

'9ê Nîsanê

Pêşniyara îngUîztanê ya ku di Bazara Aboriya Ewropê de hat qebiil kirin, ew çii KN. Sovyet ii Çîn ji pêşnîyarê ne memniin in. îraqê pêşnîyarê protesto kir.

Rojnamevanên ku li herêma sînorê Tirkiyê ii îraqê ne, dibêjin ku ; "hîn jî alîkariya xwarin , cil û berg û îlaç nehatiye. Tirk bi zanabûn altkariyê li paş dixin. Bi peran difroşin penaberan." îşev TV. nîşanda ku penaber ji birçibiiniyê reh ii qurmê daran dixwin. Eskerên Tirk der-

150

bederên Kurd gulebaran kir ii 3 kes hatin kuştin. Bi dehan

birîndar biin.
Mesiid Barzanî daxuyaniyek da çapemeniya cîhanê ku,
dema hezên Saddam ketin herêma Kerkiikê gundê Karahejîn
ji binî ve, ji navê rakirin. 3000 kes di gund de
dijîyan, yek ji wan nehêştin hemiiyan, biçiik bi mezinan
ve 3000 kesî di navbera çend saetan de kuştin. Rojnameyên
Swêdê Aftonbladet ii Expressen di roja 9'ê nîsanê
de, vê niiçeyê belav kirin.
Heta niha milyonek kes derbasî îranê, 250 hezar jî
derbasî Tirkiyê ii qasî milyonek jî, li nêzî sînorê Tirkiyê di
nav berfê de vekirî, tazî ii birçî dimînin.
Li gor rojnamevanên BBC, Kurdên Kurdistana Tirkiyê
bi kamyonan xwarin ii eşyan berhev dikin û dibin
herêmê, eskerên Tirk ji wan digrin û bi peran difroşin penaberan.
Kurdên Stockholmê, îro jî, li ba konsolosxana Amerîka
protestoyên xwe domandin.
Hukimeta Swêdê civiya ii ji bo koitsolosxana Iraqê ku di
roja 7'ê mehê de, li Stockholmê li dij Kurdan çek bikaranîbii,
wê biiyerê bê qaniinî dît. Hukiinetê 48 saet wext da
konsolosxanê ku kê ii kîjan çek bi kar anîye divê bêje. Çek
teslîmê hukimetê bike. Konsolosê îraqê çek bikaranînê
înkar dike ii dike ser Kurdan.
lO'ê Nîsanê
Hukimeta Finlandiyê biryara derxistina dîplomatê
îraqê yê ku li konsolosxana Helsînkî dixebitî da. Wî çend
roj berê çek U dij Kurdên xwepêşand bikaranî bii.
Berdevikê Qesra Spî îro di presskonferansekê de got, ku
"me îraqê agahdar kirtye ku ji paraleîa 36 jor ve nikare

balafir û helîkopterên xwe bifrîne û li dij penaberên Kurd bikar btne".
151
Ev herêm heta 30 km başiirê Hewlêre diçe.
Ji serî ve îngiliztan dixwaze, ku li Kurdistana Başiir herêmeke ewlekar pêk bîne ii îraq nikaribe leşkerê xwe U vê herêmê bi cîh bike da ku Kurdên derbeder bikaribin U wir bi cîh bibin. Di vê mijarê de, Amerîka dudil e.
îngilîztan dixwaze ji bo vê herêma ewlekar, Amerîka nerm bike ii pê bide qebiil kuin. Lê, Sovyet, Kuba ii Çîn li dij vê herêmê derdikevin ii dibêjin "em nikarin mudaxeleyê nav axa îraqê bikin".
îran ji herêma ewlekar re pişgirî kir, lê belê, ne bi tenê ji bo Kurdan herweha ji bo Şîîyên bakur jî daxwaz kir.
Tirkiyê di derheqê herêma ewlekar de dîtina xwe guhart ii got ku " heger îraq êrîşê penaberê Kurd neke, herêma ewlekar ne pêwîst e.
îraq, dixwaze Tirkiye bomya petrolê ku ji Kerkiikê tê ii derbasî Tirkiyê dibe ii li îskenderiinê eksport dibe, vebike.
Ji ber ku di dema şerê Xalîcê de, Tirkiyê wan boriyên petrolê girtibii. Ew ambargoya ku li ser Iraqê hebii heta niha dom dike. îraq dixwaze bi petrolê devê Tirkiyê şil bike. Û ambargoyê bişkîne. Lê, Tirkiyê bersiva îraqê neda.
îraq dibêje ku " Ji derê vê, em dixwazin têkiliyên ekonomîk jî, bi Tirkiyê re daynin".
Tarik Azîz, di TV. de got ku; "ev tiştên ku hate serê Kurdan ne sûcê me ye; sucê Amerîka, Rojava û Turgut Özal e. Wan, Kurdan xapandin û li dij me rakirin".

Piştî şerê Kuweytê îro cara yekemîn rojnamevanên bîyanî çiin Bexdayê. Jîyanê U Bexdayê normal dîtin ii sibê jî, dê herine Kerkiik ii Silêmaniyê.
Tirkiyê bi awakî resmî da xuya kirin, ku heta îro 70 hezar Kurd derbasî Tirkiyê biine ii li aliyê îraqê jî, qasî 200 hezarî Kurd li çiya hene. Rewşa penaberan gelek xirab e. Hîn jî xwarin, cil ii berg negehîştiye wan. Ji birçîbiin ii sermayê dimrin. Ji birçîbûnê êrîşî erebayên xwarinê dikin ii eskerên Tirk do li Çukurca 3 kes kuştin ii gelek kes

birîndar kirin. Li Kurdistana Bakur gelê Kurd bi fedakarî xwarin, cil ii berg berhev dike, lê, esker ii çaş (koricî) ji wan digrin ii bi peran difroşin penaberan. Dewleta Tirk jî ew alîkariyên ku ji Ewropa tên bi zanabiin formalîte sedem şandidin ii bi paş ve dixin. Rojnamevanên Tirk bi xwe van tiştan dibêjin ii dinivîsînin.
Li gor Rojava şer di nav Pêşmêrge ii hêzên Saddam de cîh bi cîh dom dike. Pêşmêrge têkneçiiye, lê ji bo kuştina xelkê sivU xwe ji bajaran paşve kişandiye. Ya din jî, hêzên îraqê bi helîkopter, balafir ii scudên diirmenzîl bajarên Kurdistanê wêran dikin. Ji ber van sedeman pêşmêrge şerê nav bajar rawestand ii hêzên xwe kişand derê bajaran. Li gor niiçegîhan ii rojnamevanên bîyanî, li derî bajaran hêzên pêşmêrge piraniya axa Kurdistanê kontrol dike ii heger bixwaze dikare bajaran jî bigre. Gelek bajar ii qeza bi roj di bin kontrola hêzên îraqê ii bi şev di bin kontrola hêzên pêşmêrge de ne.
Kurdan li ba Parlementoya Swêdê xwepêşandanek pêk

anîn. Ji derî Partiya Sosyal Demokrat, ji hemii partiyên ku di parlementoyê de griibên wan hene, yek hat, axaft ii pişgiriya xwe dîyar kir. Beşdaran ji ba parlementoya
153
Swêdê, bi gulên sor çiin ser gora Olof Palme ii gul avêtin ser gora wî. Ji wir jî çiin ba ew Kurdên ku di xwepêşandana birçîbiiniyê de ne ii wan zîyaret kirin. Ji ber ku li Stockholmê, li dêrekê xwepêşandina birçîbiiniyê domdike. Bi sedan Kurd çiin birçiyan zîyaret kirin.
Kurdên li Sovyetistanê, di nav xwe de komîtek çêkirin ii komîtê dest bi kariibar kir. Kurdan presskonferensek li gel çapemenî, TV ii radyoyên Sovyetê pêk anîn. Bê dengiya Sovyetê protesto kirin. Li ba Wezereta Kariibarê derveyî ya Sovyetê Kurd ketin xwepêşandanên birçîbiiniyê. Herweha, Kurdan li bajarên Tîblîs, Bakii, Erîvan ii Moskovayê civînên protesto kirinê çêkirin.
Carek din li rêya penaberiyê
"Serhildana dînî hat peîaxtin. Niha wexta reformên demokratîk û avakirina welêt e".
'30ê Adarê, şeva Şemiyê, di radyoya Bexdayê de weha digot serokvezîrê Iraqê Sadiin Hamadî.
Li ber çavên dinê, U ber pozê general Norman Schwarzkopfê ku li ser biryara FN'ê ii daxwaza Bush dê Kuveyt rizgar bikra ii li Iraqê demokrasî bida avakirin. Tanq, top ii helîkopterên Saddam agir dibarand ser serên Kurda. Kuveyt hat rizgarkirin, lê belê, avakirina demokrasîya Iraqê, her çawa bii ez nizanim, ji Saddam re hat hewale kirin.

Saddam dixwaze demokrasî ii welatê xwe avake! Ji bo wî jî, divê berî her tiştî muxalefeta Iraqê ii bi taybetî Kurdên reben ii bê xwedî bên pelaxtin, bên kuştin ii ji welatên xwe yên bav ii kalan bên avêtin. Pêşî mirova bikuje ii piştre demokrasiyê avake!

154

Di van rojan de, niiçeyên Rojname, televîzyon ii radyoyên dinê der heqê penaberên Kurd de ne. Sefalet ii trajedîya mirovên Kurd li ekranên televîzyonan kêm nabe. Niiçegîhanên gelek rojnaman li ser sînorê Tirkîyê, Irak ii îranê, di nav penaberan de niiçeyan çêdikin ii bi rê dixin. Niiçeyên di der heqê penaberan de, nîşan didin ku Saddam ii generalên wî, dê demokrasîyek ii pêşerojek çawa ji bo Kurdan avake.

Di 2'yê Nîsanê de, heUkopterên Saddam 500 penaber U ber çavên rojnamevanan, bi bombeyên fosfor qetil dikirin. Bi hezaran penaberên Kurd di bin agir û gulebarandina helîkopteran de berbi tixûbê Tirkîyê, îranê ii çiyayên Kurdîstanê ve dimeşîyan. Zarokên betena kiras ii xwas yên ku ji bombeyên Saddam rizgar dibiin, vê carê, di hemêzên dayikên xwe de ji serma ii ji birçîbiinê dimirin. Bi sed hezaran penaberên ku di 4'ê Nîsanê de xwe digîhêyandin ber tixiibê Tirkiyê, bi gulebarandina eskerên tixiib dihatin rawestandin. Li gor Wezareta Derveyî ya Tirkiyê çarîk mUyon penaber li ber tixiib kom biibûn ii imkanên Tirkiyê tune bii, ku hewqas penaberan qebiil bike. Tixiibê Iranê carek din weha li riiyê penaberan hatibii girtin.

Di 4'ê Nîsanê de îranê jî, wekî Tirkiyê digot, em nikarin bi sed hezaran penaber qebiil bikin. Li gor Ajansa Niiçeyê îranê milyonek penaber li ber tixiibê îranêrawestabiin. îranê digot, "ji bo qebuUdrina heinii penaberan em amadene, lê belê imkanên me tune." îran ii Tirkiyê, ji FN'ê, ji Xaça Sor ii ji dewletên din aUkarî dixwestin.
Di 5'ê Nîsanê de, "Komîta Şoreşê" ya Iraqê carekî din digot:
"Serhildan hat peîaxtin".
Li gor Komîta Şoreşê, yên kuvê carê hatibiin pelaxtin pêşmêrgeyên Kurd biin. Lê, di rastî de weha nebii.
155
Pêşmêrge ji bajaran paşve vekişyabiin. Yên ku hatibiin pelaxtin Kurdên sivîl ii bêparastin biin. Saddam ii generalên wî, derveyî banga jorîn, afiiyek tevayî jî, ji bo Kurdan îlan dikir. Lê ew Kurdên ku zor bikaranîne, Kurdên ku mal ii tiştên xelkê talan kirine ii Kurdên ku tecawuzî pîrekan kirine li derveyê afiiyê diman!
Roja ku Saddam ji bo Kurdan efû îlan dikir, hêjmarên penaberan digihîşt 2 milyonan. 2 milyon mirovên Kurd, jin, mêr, pîr ii zarokên tazî ii xwas, bi zikên tîh ii birçî, ji ber xezeba Saddam direvîyan, nexweş dibiin, dimirin ii dihatin kuştin.
Di 5'ê Nîsanê de NATO, 6'ê Nîsanê de FN'ê ji bo trajedîya Kurda Iraqê lanet dikir. Lê, ne NATO ii ne jî FN zêde nikarî bii tiştek bikira, ji ber ku mesela Kurd meseleyek hundirîn bii! Serokê Amerîkayê Bush di deryayê de masî digirt ii digot:

"Ev mesele, meselekî hundirî ye. Em nikarin tiştek bikin. Li nav FN'ê, Sovyet, Çîn, Hîndîstan ii Kuba nedihîştin ku biryarek pozitîf ji bo alîkarîya Kurdan bê girtin.

Lê, bi sed hezaran penaber, bi trajedîya xwe, mesela Kurd kirin meseleyek hemii dinê, hemii însanan ii însanetiyê. Êdî li hember vî trajedîyê çavgirtin ii kerrbiiyin ne mumkun bii. Di 7'ê Nîsanê de, helîkopterên Amerîkayê xwarin, vexwarin, batanîye uhw. bi paraşiitan ve, ji penaberan re davêtin. Di eynî rojê de, Wezîrê Derveyî yê Amerîkayê, Jamas Baker, ji bo penaberan diçii Tirkiyê.

'9ê Nîsanê de Koma Ewropa (EG) li Luxemburgê, ji bo Kurdan, biryara avakirina herêmeke azad digirt.

Li gor texmînan Komîsyona Penaberan a FN'ê; herî dawî, 715 hezar penaber derbasî îranê ii 280 hezar penaber jî derbasî Tirkiyê biibiin. Bi sed hezaran penaber li ber tixiibên Tirkîyê ii îranê, di bin sar ii sermayê de diqefiUn,

nexweş dibin ii dimirin. Li gor niiçekanîyên Tirkiyê, heta niha 1500 kes mirine, piranîya wan zarok in.

Xwarin, vexwarin, derman, bataniyê ii tiştên ku bi balafiran tên balafirgeha Dîyarbekirê, bi qamyonên mezin neqlên sertixiib dibin. Piştî 12 saet rê, qamyon digîhîjin ber tixiib. Lê belê, barên qamyonan nagîhîje wî aUyê tixiib. Çiyayên bilind ii asê, rêyên herî ii celb îmkan nade ku xwarin ii vexwarin bigîhîje penaberan. Divê helîkopter bibin ii heUkopter jî tunin.

Li vî alîyê tixiib, gava mirovên birçî ii tîh ji bo nanek, bataniyek ii tasek av bihev dikevin, li wî alîyê tixiib, zar ii zêç, kal ii pîr, çav li rê, benda nanek ii benda tasek av in. Zarokên ku di hemêzên dayik ii bavikan de diqefiUn ii dilerzin, laşê wan ên teze ii bêteqet mor dibe ii deng ji wan tê birîn. Edî ew nan naxwazin, av jî naxwazin...
Volkmar Schultz-Igast, ji Xaça Sor a Elman jî çiiye wir, ba penaberan. Ew ji rojnamevanek re weha dibêje:
-Ji 10 zarokan 9 emel in. Di laşên wan de av nemaye. Hêjmarên zarokên nexweş ji 10 hezarî zêdetir e ii salê wan bin 5'an de ne.
Do min jinikek dît. Zarokek di hemêza wê de bii. Piştî sê rojan zarok li ser çiyê ji sermayê miribii.
Xorto
ll'ê Nîsanê
Hîn jî alîkari baş negehêştiya penaberên Kurdên ku li ser sînorên Kurdistana Tirkiyê ii yê Kurdistana îraqê ne. TV bi dehan cesetên zarok ii mezinan nîşanda. Kurd bu-çî ii tazî ne. Êrîşê xwarinê dikin. Baran dibare. Serma bi şevan dikeve binê sifirê. Ji ber tirsa helîkopter, balafir ii tanqên îraqê Kurd ên ku li nêzî sînorên Tirkiyê ne, li serê
157
çiyayên bilind dimînin. Newêrane dakevin cîhên rast, ku aUkari zii bigehê wan. Çiya giş bi berf in. Derbeder,bê kon ii kinc in. Piraniya wan bi cilên tenik ii qetandî ne. Betanî ij lehêv tunin. Ji ber vê yekê ji serma ii birçînan rojê kêmasî 1000 kes dimrin. Pu-aniya yên ku dimrin zarok, kal ii pîr in. Li gor niiçegîhanan, U ser tixiibê Tirkiyê hejmara

penaberên Kxird gehîşt 400 hezarî.
Cara yekem niiçehînanên cîhanê gehîştin Iranê ii rewşa penaberên Kurdên li îranê nîşandan. Rewşa wan ji yên li Tirkiyê ii ji yên ser sînor xerebtir e.
Hêzên Saddam îro li herêma Kerkuk ii Sulêmaniyê li dij Kurdan dîsan helîkopteran bikaranî. Lê, Amerîka hîç deng demexist. Xwe kerr ii lal kir.
Wezîrê Kariibarê Derve yê îraqê Tarik Azîz, Tirkiyê ii îranê siiçdar kir ii got: " Tirk nahêlin Kurd li Tirkiyê bi kurdî bipeyîvin ii îran jî hebûna Kurdan qebiil nake; lê, me otonomî daye Kurdan. Dîsan jî, ev herdu dewlet ji bo Kurdan li ser me komployan çêdikin".
Ji aliyê din ve, Tarik Azîz xwest were Tirkiyê ii li ser pirsa Kurdan bi Tirkiyê re rûne. Tirkiye li ser vê yekê difikire.
Di ser Bexdayê re, cara yekem di bin kontrola hêzên Saddam de, 20 rojnamevanên bîyanî çiine herêma Kurdistanê.
Rojnamevanê Tirk AU Haydar Yurtsever, niiçeya xwe weha digîhandin BBC' yê:
"îro em 20 rojnamevanên bîyanî di bin kontroîa hêzên Saddam de çûne bajarên Kerkûk û Silêmaniyê. Her cîh wêran bûye.Li wan bajaran kontrol bi temamî di bin destê hêzên îraqê de ye. Ji sivtlan bêtir esker îi wan bajaran hene. Nehiştin em bi xelkê re qise bikin. Piraniya xeîkê bi kurdî qise dikirin. Berê roket û topan bi çiyan ve ne. Li Siîêmaniyê qetîîam heye. Bi dozeran ji bin erdê cesed deranîn. Bi sedan kes kuştine û kirine bin erdê. Cesedên wan nayêne naskirin. îraq dibêje ku "Kurdan di dema

bajêr girtine hemû esker, endam û kadroyên Partiya BAAS qetiî kirine".
Bi Tirkmenan re peyîvim, wan digot "sûcê me tune. Berê Amerîkiyan me bomba kirin, paşê Kurd hatin û mirovên me kuştin".
Li Stockholmê kor\solosxana Swêdê navê ew dîplomatê xwe yê ku bi çekê otomatîk li Kurdan çek teqandibiin da dewleta Swêdê. Hukimeta Swêdê, wî kesî ji Swêdê derxist ii wê çekê otomatîkê ku bikaranî bii jî, ji konsolos dixwaze. Konsolosa îraqê heta niha çek teslîm nekiriye.
Kurdan, li ba konsolosxana Kubayê ya li Stockholmê mîtîngek pêk anîn ii helwesta Kubayê ku li KN li dij Kurdan girti bii protesto kirin.
'2ê Nîsanê
Hemii TV. yên cîhanê perîşanî ii belengaziya derbeder ii penaberên Kurd di niiçeyên xwe yên yekemîn de didin. Di rojê de, bi hezaran derbeder ii penaber ji serma ii birçînan dimrin. Hîn jî alîkariya navnetewî baş ii têr negihîştiye wan. Tazî, birçî ii pêxwas in.
Amerîka biryar girt, ku di hewa, erd ii di avê de bi lez ii bez alîkariyê bigîhîne penaberan. Amerîka ji bo vê yekê 100helîkopter amade kir. Ji aliyê din ve Amerika dîyar kir, ku "/i Kurdistanê ji bo penaberan herêmeke azad pêwîst e".
Sovyet, li dij avakirina herêmeke azad derket ii got:
-Em pêşnîyariyeke weha qebûl nakin, ji ber ku dê ji bo rojên pêş ev bibe mînakeke ne baş.
IngiUztanê got:

-Herêma azad bi nîyeta îraqê ve girêdayî ye. Em pişgiriya vê pêşnîyariyê dikin.
Koma Netewan biryar girt ku ji 50-100 kesî heyetek bişêne îraqê ii di derheqê rewşa derbeder ii penaberan de 159
bi îraqê re bipeyîvin.
îraqê, ew efûya ku ji bo Kurdan çend roj berê derxistibiin hefteyeke jî dirêj kir. Li gor niiçevanên Ewropî ku li Iraqê ne, kêm kes bi paş ve vegerîne cîhên xwe. Kurd, ji Saddam ii efiiya wî bawer nakin.
Wek tê zanîn Civata Aboriya Ewropê 180 milyon dolar ji bo penaberan dê bişêne. Ji wê 3/2 bişênin îranê.
Kurdên Awustralyayê jî li bajarên Sydney, Briston û Meîbourn li ba konsolosxanên Amerîka dest bi xwepêşanên birçîbiiniyê kirin. Kurdan delegasyonek pêk anîn ii delegasyon bi bi wezîrê Kariibarên Derveyî yê Awustraliyayê re têkilî danî. Wezîr delegasyonê qebiil kir ii guhdariya daxwazên wan kir. Serokê kevin ê hukimetê Malcon Frosor bi însîyatîva xwe dest bi kampanyaya alîkarî ya derbederên Kurd kir. Serokwezîrê Awustral yayê jî soz da Kurdan ku pirsa Kurd bibin Koma Netewe yan.
Swêdê, mîqtara alîkariyê ji 40 milyon kronî derxist 100 milyon kronî. Balafirên Swêdê dest bi birina xwarin ii eşyan kirin. Swêd naxwaze alîkariya xwe teslîmê Tirkiyê bike. Ji ber vê yekê alîkariya Swêdê gelek bi derengî ket. Di vî wari de tecriibeyên Swêdê hene. Di 1988-an de Swêdê ji bo penaberên Kurd alîkariyê şandibii Tirkiyê. Dema

heyeta Swêdê çii ii di cîh de alîkariya xwe kontrol kir, dît, ku Tirkiye, ji % 80 aUkariyê negîhandiye penaberên Kurd. Konsolosê îraqê, ew çekê otomatîkê ku U dij ew Kurdên ku êriş biribiin ser konsolosxanê bikaranî biin îro teslîmê dewleta Swêdê kir.

'13ê Nîsanê

Opozîsyona Amerîka ii cîhanê di pirsa Kurd de zorê dide Bush ii îdara wî. Bush, îro presskonferansek pêk anî ii bi awayekî hêrs weha got:

160

-Ez leşkereke xwe naşînim şer an jî herêma Kurdan. Biîa vê yekê her kes bizanibe. Lê, em ji bo penaberan alîkariya cil û xwarinê dikin.

Wezîrê Kariibarê Derveyê Almanyê Gensher, îro di derheqê Saddam de daxuyaniyekî da ii di daxuyaniya xwe de got:

-Saddam li dij huqûqa nav dewletan, li dij qanûna Koma Neteweyan sûcê mezin kiriye. Ew sûcdarê şer e. Ev sûç divê neyê efûkirin. Pêwîst e Koma Neteweyan Saddam mehkeme bike. Wek Hîtler û hevalên wî ku li mehkemeya Nurnbergê hatin sûcdarkirin..

îraqê, cara duyemîn rojnamevanên bîyanî bire Hewlêrê. Rojnamevanê Tirk Alî Haydar Yurtsever di vegerê de, li ser gera Hewlêrê ji BBC re weha digot:

-Em îro di kontrola hêzên îraqê de çûn bajarê Hewîêrê. Hewlêr wêran bûye. Şewitiye, xirabûye. Portreyên Saddam hemû hatine çirandin û li ser dîwaran sloganên hêzên Kurd hene. Bajar bi temamî di bin kontroîa îraqê de ye. Li

nav bajêr û îi derdor û ser xanî yên resmî bi çekên giran leşkerên îraqê hene. Bajar bi tank û top tije ye.
Min bi serokê herêma Otonomî EI Berzencî re qise kir.
Wî got:
-Çete, çapûlvan û terorîst hatin bajar xirab kirin. Geîek kes kuştin. Talan kirin û çûn. Em dê cezayê wan bidin. Ji wan re efû tune. Ew hevsarkêşên dijmin in....
Li gor şirovevanên BBC, "Amerîka û hevalbendên xwe pêşî pişt U Saddam şikandin. Paşê dîtm ku Kurd li Bakurê îraqê bi hêz biin ii U başiir jî Şu. Ev ji bo Amerîka, Tirkiye

ii hevalbendên wan bii tehlîkeyeke mezin. Ji ber vê yekê rêdan ku Saddam vê tehlîkê bişkîne ii yekîtiya îrakê biparêze.. Û kirin. Saddam Kurd ii Şuyan şikand. Niha dor hatiye ser xistina Saddam. Dê di demeke gelek kin de Saddam bixin ii herweha penaberên Kurd jî bi paş ve vegerin malên xwe. Ji ber vê yekê Amerîka niha ji penaberan re alîkariya xwarin ii vexwarinê dike".
Kevneserokwezîrê Tirkiyê Suleyman Demirel îro çii Çukurcayê penaberan zîyaret kir ii bi kurdî ji penaberan re got:
-Merak meke!
Û bi tirkî dom kir:
-Em, we bi tenê nahêîin. Heta niha em bi tenê bûn, lê niha dinya hat alîkariya we.Di van çend rojan de di ber xwe bidin, aiîkariyeke mezin dê bigêhe we.
Li HoIIandê Kurdan avêt ser konsolosxaneya îraqê ii agir berdan Konsolosxanê. Polîs 8 Kurd girtin.

Federasyon ii rêxistinên Kurd li Swêdê bi hevdu re li gelek bajarên Swêdê li meydanan civînên vekirî pêkanîn. Di van civînan de li ser rewşa Kurdistanê agahdarî dan Kurd ii Swêdîyan, merş ii stranên şoreşgerî pêşkêş kirin, helbest xwendin, pere berhev kirin.

îro jî hemii rojnameyên Swêdî di riipelên xwe yên yekemîn de fotografên Kurdên penaber weşandin ii li ser rewşa penaberan diir ii dirêj nivîsandin. Radyo ii TV yên Swêdê jî, di serê her saetî de, li ser rewşa penaberên Kurd niiçe belav kirin.

'14ê Nîsanê

Trajediya penaberên Kurd her berdewam e. Hîn jî, ji birçî, serma ii nexweşiyê bê bêjmar kes dimirin. Helîkopterên Amerîka, Fransa ii îngiliztanê xwarin

dawêjin serê çiyan, lê têr nake. Ji Kurdistana îraqê ber bi sînorê Tirkiye ii îranê ve koçkirin berdewam e. Penaberên ku derbasî Tirkiyê biine cîhwarê wan çiya ye ii ji bo çiindin ii hatinê ne baş e. Tirkiye destpêkir ku cîhwarên wan biguhêre ii wan ber bi cîhwarê rast ve bîne.

Ji bo alîkariya xwarin ii eşya 2000 leşkerê Amerîka hatm bajarê îskenderiinê. îngiliz 2 ii Alman jî 6 helîkopter xiste xizmetê.

îranê dîsan ji bo penaberan ji rêxistinên navnetewî aUkarî xwest.

Koma Netewa ji bo pirsa penaberan heyetek şande Bexdayê. Li gor ajansan, heyet bi wezîrê der ii wezîrê agahdariyê yên îraqê re riiniştin ii pirsê gotiibêj kirm.

Saddam Huseyîn îro çii Hewlêrê. Li Hewlêrê axaftinek kir. ESsan got ku:

-Min ji bo penaberan efû derxistiye. Ew dikarin vegerin. Lê, ji qatil, talankar, xaînan re efû tune.

Çend parlementerên Ingiliztanê li Kurdistanê bi Celal Talabanî re têkiU danîn.

Li gor niiçeyên ku BBC dide, hîn li herêma Kurdistanê Kurd ii başiirê îraqê jî Şîî cîh bi cîh li dij hêzên Saddam şer dikin.

Li Dîyarbekirê ji derê partiya ANAPê hemii partiyên legal ii gelek rêxistinan bi hevdu re mîtîngeke mezin pêk anîn. Di mîtîngê de qasî 6-7 hezar kes beşdar biin. Bi kurdî axaftin. Li dij Bush ii Saddam derketin. Di dawî de, ji beşdaran hinek "bijî Kurdistan" qîrîyan. Şer derket. 10 kes birindar biin ii gelek kes ji aliyê polîs ve hatin girtin.

Li Stockholmê Komîta Parastina Mafên Kurdan li Swêdê ii çend rêxistên Swêdî bi hevdu re U Sergels Torgê mîtîngek çêkirin. Qasî 4000 kesî di mîtîngê de beşdar biin.

Li ser navê Hukimetê Wezîrê Kariibarê Derve yê Sten

Andersson qise kir. Wî behsa trajediya penaberên Kurd kir ii got:

-Pirsa Kurd ne bi tenê pirsa penaberan e. Pirseke polîtîk e. Divê di nav Pirsên Rojhilata Navîn de pirsa Kurd jî bê qareserkirin. Divê Saddam û rejîma wî ji desthilatiyê herin. Pirsa Kurdan pirsa demokrasiyê ye. Pêwîst,e Kurdên Kurdistana îraqê di nav îraqê de, xwe bi xwe îdare bikin.

Niha di nav Wezîrên Kariibarên Derveyî yên Swêd, Fransa, îtalya ii Spanyê de, ji bo pirsa Kurdan hewldaneke xebatê heye, got Sten Andersson.

Serokê Partiya Folk Beng Westerberg, serokê Partiya Çep Lars Werner, ji Partiya Center parlementerek, Serokê Komîta Aştiyê ii ji Komîta Parastina Mafên Mirovî ji bo Kurdan jî Thomas Hammarberg axaftin. Hemiiyan di axaftinên xwe de, "bi zûtirîn alîkariya penaberan bikin û pirsa Kurd, pirseke netewî ye, polîtîk e. Divê di organên navnetewî de bê rojevê. Koma Neteweyan divê insîyatîv bigire" .

Dr. Mahmiid Osman jî axaftinek kir ii di axaftina xwe de ji Swêdê alîkariya navnetewî daxwaz kir.

Nazir Rezazî, çend stran û merş got ii Şerko Bêkes jî çend helbest xwend ii helbestvaneka swêdî ji helbeStên v^^î wergêran swêdî.

'15ê Nîsanê

Çapemeniya cîhanê îro jî bi niiçe ii fotografan derbederî ii perişaniya penaberên Kurd di riipel ii rêza yekemîn de dan ii belav kirin.

Serokwezîrê Tirkiyê ii yê Ingiliztanê li Londrayê, li ser

164

rewşa penaberên Kurd rawestan ii li ser herêma ewlekar israr kirin. Penaberên ku li herêma SUopiyê li çiyê biin , ji wan 20.000 î ji cîhên wan rakirin ii birin heremeke navrast ku baştir bikaribin ji wan re alîkariyê bikin; Yên din yên li vê herêmê jî, dê peyder pey bibin wê herêma nii ii wan bi cîh bikin. Amerika ji bo herêma ewlekar li Batman

ii Dîyarbekrê karagahek pêk anî ii xebata herêma ewlekar li ser temambiinê ye. Hîn doktor ii personelên tenduriistiyê negîhane herêma penaberan. Piraniya nexweşan zarok in. Li Çukurcayê doktorekî Fransê daxuyanî da BBC ku "bi lez ii bez tedbîr neyên stendin, dê ji nîvî bêtir penaber ji birçibiin, serma ii bê dermaniyê bimirin". Penaberên nii yên ku li Kurdistana Iraqê ne ber bi îranê
165
ve direvin, leşkerên îraqê bi helîkopter ii topan wan gulebaran kirin ii li gor nûçeyan bi sedan kes kuştin.
îngiliztanê di meclisa Avam de pirsa herêma rizgarkirî gotiibêj kirin. Gotin ku; " ev herêm nayê wê manê ku em Kurdistaneke serbixwe çêdikin, an dixwazin. Ev ji bo parastina penaberan e. Em yekîtiya axa îraqê dixwazin. Ji ber vê yekê, em di pêşniyariya xwe ya herêma rizgarkirî de israr dikin ii divê em di Koma Neteweyan de dîsan wê bînin rojevê. Heger Saddam 3 caran êrîşê herêma rizgarkiri bike, divê em li dij wî quwetê jî bikar bînin".
Wezîrên derve yên Koma Ewropayê piştgiriya pêşniyara Elmanyayê kir.
Elmanyayê goti bii, ku "divê mirov Saddam bide mehkemeya Koma Neteweyan, ji ber ku wî mafên mirovan îhlaî kiriye. Saddam sûcdarê şer e." Fransa, Belçika ii îngUiztanê piştgiriya vê daxwazê dikin.
Celal Talabanî daxuyaniyek da:
-Pêşmergeyên ku derbasî îranê bûbûn bi paş ve hatin Kurdistanê. Niha em gelek bi hêz in. Em dê êrîşeke mezin bibin ser bajarê Siîêmaniyê. Em dikarin çend bajaran dîsan

bi paş ve bigrin.
TV ya Swêdê KanaI-1 bi endamê Komîta Kurd ii serokê Rêxistina Parastina Zarokan Thomas Hammarberg re întervuyeke çêkir. Thomas, li dewletên Hevkar rexne girt ku ew duriiti dikin:
-Ew niha îi pêwendiyên aştiyê digerin. Ma kuştina 2 miîyon Kurd îi derî aştiyê ye?
U Thomas, ji bo Kurdan ji Swêd ii hemii cîhanê aUkari xwest.
Dîsan Endamê Komîta Kurd ji bo Mafê Mirovî Bilal Görgii daxuyaniyê da Radyoya Merhaba, wî, xebat ii daxwazên Komîtê weha rêz kir:
- 1Divê Koma Neteweyan ji bo penaberan herêmeke 166
azad û ewlekar çêbike.
-2îran û Tirkiye sînorên xwe ji penaberan re vekin.
-3Koma Neteweyan çareserkirinên bingehîn û dûr û dirêj pêk bîne.
-4Divê oposîzyona îraqê bê destek kirin.
-5Di pirsa Rohjilata Navtn de, pirsa Kurd jî bikeve rojevê.
îro jî, di rojnameyên Swêdê de gelek li ser Kurdan niiçe ii şirovan cîh girtin.
'6ê Nîsanê
Di derheqê pirsa derbeder ii penaberên Kurd de, muxalefet û raya gişiya Amerîka ii ya cîhanê tesîreke mezin li Bush kir.
Bush bi zixtan hişyar bû

û bi lez û bez kete atakê
Bush nîvê şevê, di dîtinên xwe de 180 derece guhartin
çêkir ii kete hareketê. Wî, telefonê serokwezîrê îngiliztanê
John Major, serokkomarê Fransê François Mitterand, serokomarê
Tirkiyê Turgut Özal, Şansolyê Almanyê
Helmut Kohl ii Sekreterê Giştiyê Koma Neteweyan Javier
Perez de Cuellar kir ii li Kurdistana Iraqê di derheqê
pêkanîna herêma azad ii ewlekar de dîtinên wan girt.
Bush, biryar da ku hêzên Hevkar di cîh de bikevin Kurdistanê
ii aUkariya penaberên Kurd bikin. Wî, emîr da ku
10hezar leşkerên Amerîka bi helîkopter ii satelîtan topografiya
herêmê bikşînin ii cîhê bajarên konan dîyar bUcin.
Bush da dîyarkirin, ku; " ev kar îi gor biryara Koma Neteweyan
a 688-an e. Divê hêzên Hevkar îi Kurdistana
îraqê ji paraîela 36 jor ve bigrin garantiyê. Heger hêzên
Saddam mudaxeîe bikin, pêwîst e, ku hêzên Hevkar bersi-
167
va wan bi çekdarî bidin. Divê di demekî geîek kin de
hêzên Hevicar xwarin, kon, betaniye û îlaç bigihênîn derbeder
û tengezarên Kurd".
Serokwezîrê îngiliztanê John Major, got ku; "ev kirinên
Saddam jenosîd e. Divê Koma Neteweyan li Saddam
mehkeme veke" .
Serokwezîrê Tirkiyê YUdu"un Akbulut, li Londrayê presskonferanseke
pêk anî ii di derheqê penaberan de weha
got:
-Pêwîstiya derbeder û penaberan bi alikariyeke mezin
heye. Divê Ewropî alîkariyê bidine Tirkiyê û Tirkiye jî

rojek zûtir bigîhêne wan. Ewropî aîîkariyê nakin, lê rexne li Tirkiyê digrin. Di 1988-an de jî, dîsan qasî 100 hezarî penaberên Kurd hatibûn Tirkiyê. Ewropiyan bi tenê 5 hezar girtin. Yên din di stuyê me de hiştin û rexne li me girtin û hîn jî digrin. Aîîkari ne çareserkirina pirsa penaberan e. Çareserkirina bingehîn pêkanîna îmkanên bi paş ve şandina wan e.

Niiçegîhanê BBC ya beşa tirkî Timiiçîn Tiizecan bi helîkoptereke îngiliz li gelek cîhên derbeder ii penaberan geriya ii niiçeyên xwe gihêştan Londrayê. Wî rewşa penaberan felaketeke mezin didît. Wî, li Kampa Çukurcayê ji hemşîreke bidilxebat pirsî; hemşîrê digot:

-Li vir aspirîn jî tune. Yek ji wan re aîîkariyê nake. Di vê kampê de rojê bi kêmasî 40 zarok li ber çavên me dimrin. Ez bi xwe nikarim tiştekî bikim. Ev felaket e. Ez bi girînê aîîkariya xwe didim xuya kirin.

168

"Em pismam in, lê,
ew Kurd in, ez Tirk im".

Dîsan niiçegîhanê BBC ji parezvanekî gundan)Köykomyucusu) dipirsî:

-Hiin çi dikin?

Parezvan:

-Em alîkariya derbeder û penaberan dikin. Ji ber ku piraniya yên ku hatine vê kampê ji eştreta me ne. Eşîreta me nîvê wê îi îraqê û nîvê wê jî li Tirkiyê ye. Em mirovên hev in. Em Pismam in, xal û xwarz in. Lê, ew Kurd in, ez jî Tirk im. Ez hemweîatiyê Tirkiyê me. Xwedê

ji dewleta me razî be, dewleta me baş e û ji wan re gelek alîîcariyê dike.
ITê Nîsanê
Li ser biryara Bush, îro leşkerên Amerîka bi helîkopteran daketin ser sînorên Iraq ii Tirkiyê. Berî her tiştî dest bi avakirina konên xwe kirin. Bi helîkopteran ji penaberan re xwarin avêtin. Penaberên birçî êrîşî xwarinê dikin. Gelek kes dikevine bin lingan ii dimrin.
îraqê li gel Koma Neteweyan biryar ii ketina leşkerên Amerîkî protesto kir. Tarik Azîz got ku; " ev mudaxela nav îraqê ye û. li dij destûr û prensîbên Koma Neteweyan e".
Sekreterê Giştiyê Koma Neteweyan Javier Perez de Cuellar jî, U dij biryara Bush weha got:
-Du berpirsîyarên Koma Neteweyan ji mêj ve ji bo pirsa penaberên Kurd li Bexdayê ne û bi hukimeta Bexdayê re /i ser gelek tiştan îi hevdu kirine. Lê, niha serok Bush rabû Ji nişkan ve, vê biryara han girt. Divê em îi ser vê biryarê hûr bifikirin....
Gorbaçov, li Tokyoyê pesnê Bush da. lê, hîç behsa birya-
169
ra Bush nekir. Şirovevan dibêjin ku " pesindayîna raste rast piştgiriya biryarê ye".
Serokwezîrê îngUiztanê J. Major, piştgiriya biryara Bush kir.
Wezîrê Kariibarê Derveyîyê Elmanyayê Genscher, ji ber girtina vê biryara han dilxweşiya xwe da dîyar kuin. Piştgiriya Bush kir.

Tirkiyê, vê biryar ii plana Bush di cîh de dît. Û bi vê yekê re, Tirkiye dixwaze Iraq boriyên xwe yên petrolê veke ii petrol bêt bajarê îskenderiinê.
Konseya Ev/ropa biryar girt ii heyetek şand sînorê îraq ii Tirkiyê ji bo di derheqê derbederên Kurd de raporek amade bikin ii U gor wê aUkariyê bikin.
Wezîrê Kariibarê Derveyî yê Luksemburgê daxuyaniyek da TV. ku; "divê her dewlet, sazgeh ii kes alîkariya Kurdên Kurdistana îraqê bike".
Rojname ii TV' yên Swêdê bi wêne ii niiçeyan, rewşa penaberan anîn zimên. TV kanaI-2 jî, li ser navê Mehkemeya Koma Neteweyan, mehkemeyeke temsîlî çêkir ii Saddam kir siicdarê şer ii Saddam mehkeme kir. Ev mehkeme dê TV ê de peryodîk dom bike.
170
PIRSA KURD DI ROJEVA CÎHANE DE
'18ê Nîsanê
Parlementoya Ewropê biyar girt ku li herçar perçeyên Kurdistanê jî mafê Kurdan ên kulturî bête dayîn. Divê Tirkiye, îran, îraq ii Suriye bi Kurdan re li dora maseyek danişin. Di Konferansa Rojhilata navîn de pirsa Kurd jî bikeve rojevê.
Sibeyê dê heyetek ji serdarên Hevkar ii heyetek jî ,ji serdarên îraqê li bajarê Dihokê U ser pirsa penaberên Kurd hevdu bibînin.
Alîkariya penaberan hêdî dimeşe. Hîn jî derbeder ii penaber birçî ii perîşan in.
Alîkarê wezîrê Kariibarê Derveyê îngUiztanê, ji bo

dîtina rewşa penaberan çii Dîyarbekrê.
Rojname ii TV. yên Swêdî U ser Kurd ii penaberan niiçe, nivîsar ii şiroveyên xwe didomînin.
Li ser bûyerên li başûrê Kurdistanê dîtinên hinek dewletan
FRANSA
Serokkomar Francois MiTTERAND : YN divê bi pêwîstiya xwe ku êrîşên îraqê rawestîne rabe. Ev zulm û zordart divê bête rawestandin.Êrîşên îraqê yên îi hember Kurdan aştiya navnetewî û ewletî ya heremê dixe tehlîkeye mezin. Heta ku êrîş neyên rawestandin hemû ambargoyên li dij îraqê divê berdewam bin. Komîta Ewîetî li ser vê babetê pêwîst e, ku biryar bigre.
171
BRtTANYA
Serokwezîr John MAJOR : Pêwîst e êrîşên xwînrêj ê Saddam ên li dij gelê Kurd bi awakî bên rawestandin. Em divê bêjin Bexda "Bese!" Di bin parastina YN de, Kurd divê vegerin ser axa xwe. Li ser erdên xwe, di nav aştt û ewletiyê de bijin. Ger me dît, dê Bexda mafên Kurdan qebûl bike, wê demê parastina YN jî li herêmê dikare rabe.
Herweha ji bo dîtin û daxwazên Eniya Kurdistana Iraqê li ser pirsê bizanibe Serokwezîr J. Major, bi nûneriyekê Eniya Kurdistanê re, civînek bi darxist. Piştî ku dîtina Brîtanya bi awakt eşkere hate belavkirin, li ser pêşniyara wê di navbera pênc dewletên daîmî yê Yekîtiya Netewan-DYA,YKSS,Brîtanya Mezin, Fransa û Çîn de hevdîtin û

muneqeşe li ser pirsa herêma ewletiyê dest pê kirin.
DYA
Serokdewlet George BUSH : Ev şerê ku li îraqê dibe, şerekî hundiriye. Ez naxwazim yek leşkerê Amerîkî bikeve nav vî şerê, ku bi dehên salan in ku berdewam e. Lê, em ê alîkariya insanî bi şêwekî fereh bikin. Em ê li aliyê sînor ê îraqê ji wan re xaniyan avabikin. Ji bo penaberên Kurd ji êrîşên mumkun biparêzin, dê 8000 leşkerên me bikevin heremê. Gava, em bawer biin ew insan di nav ewîetiyê de ne, dê bikaribin jîyana xwe bidomînin, dikarin wê demê vegerin ser erd û malên xwe.
Nunerê DYA, di Komîta Ewletiyê ya YN de,Thomas PICKERING: Em, îi gor biryara 688 a YN û biryarên Civata Aborî ya Ewropa, dixwazin - Zonên Bufer (parastinê) , ji Kurdan re pêk bênin. Daxwaza me ew e ku alîkariyek mezin ji Kurdan re bê nîşandan. Ji ber vê yekê, em bang dikin hemû weîatên xwedî îmkan, ku di planên alîkariyê de cîh bigrin.
172
ELMANYA
Wezîrê Derve Hans Dietrich GENSCHER : Saddam, /z dij gelê Kurd sûcekî navnetewî dike. Ew divê di dadgehek navnetewî de cezayê vî sucê xwe bikşêne. Ji Şerê Duwemin ê Cîhanê, hdta niha jenosîd û sûcek insanî weha mezin nehatiye kirin. Ne em û ne tevayiya dinyayê, li ber vî tiştî çavên xwe nikarin miç bikin. Li hemberê Bexdayê pêwîst e, biryarên dijwar bên girtin. Mafên gelê Kurd jî yê ku bû hedefa van jenosîdan pêwîst e bên parastin û di bin

stwana (şemsiya) navnetewî de bên garantî kirin.
DANÎMARKA
Saddam êrtşên neinsanî û dijwar dibe ser gelê Kurd Bi hezarên siwîl di bin vê terorê de hatin kuştin. Pirsa Kuweytê çawa bi beşdariyek dîrekt û pratîk ji aîiyê YN ve hate çareserkirin ya Kurd jt, wusa divê bê çareserkirin.Divê YN bi hêzên leşkerî ve bikeve îraqê û van êrîşan rawestîne.
SWED
Nunerê di YN de,Jan EUASSON : Berpirsîyariya YN piştî rawestana şerê Xelîc divê dom bike. Em, êrîşên îraqê yên li dij geîê Kurd bi awakî dijwar protesto dikin. Bûyerên ku li îraqê dibin, pirsê ji pirsa hundurî derxistiye. Pirs bûye pirsek navnetewî. Eger çareseriyek jê re neye dîtin, ewletiya heremê dikeve bin tehlîkeyeke mezin. Alîkariya dinyayê jî pêwîst e mîna, ku ya Filistînî em ê niha bikaribin çareserbikin. Divê alîkariya însanî û ya styasî bê kirin. Jenosîda îi hember neteweyekî tû caran ne mumkun e bê efûkirin. Mafên Kurdan pêwîst e bên parastin. Di nav dewleta îraqê de ew divê xwedî mafên insanî û netewî bin.
173
ÎSRAÎL
Wezîrê Derve David LEVY : Em nikarin qebûl bikin, çawa dinya bi çavên girtî, jenosîda Iraqê ya li dij Kurdan derbas dike. Çawa ku ji bo Kuweytê hemû dewletên dinyayê rabûn ser piyan û bi hêzên Itşkerî pirsê çareser kirin, a Kurdan jî weha pêwîst e çareser bibe. Wekî din

divê tû kes li hêviyê nemîne, ku niha mumkun e pirsa Filisttm bê helkirin.

TÎRKÎYE

Serokkomar Turgut OZAL : Tirkiye nikare barê 400-500 hezar penaberan bikşîne. Ev pirs ji pirseke hundurî derketîye, bûye pirseke navnetewî. t^iha sînorên me di bin tehdîdê de ne. Eger Saddam êrîşên xwe ne rawestîne, em dizanin çawa wî rawestênin. Ji bo van insanan YN divê riyekê bibîne. Heremên Ewletiyê ji wan re pêwîst e bên danîn. Hingê em dikarin bihêîin ku aîîkarî ji wan re, ji ser axa me ve derbas bibin.

RAN

Serokkomar Haşimî RAFSANDCANÎ:

Ji miîyonekê zêdetir Kurd û Şîî ji zordariya Saddam reviyan û ketin axa me. îmkanên me îi mêzekirina hevqas insanî nîne. YN berê dest deyne ser pirsê. Herêma Ewletiyê ji Kurdan û Şîî yan re çêbike. Em, aîîkariya dinyayê ji bo wan dixwazin.

ÎRAQ

Serokwezîr Sadun HAMMADÎ : Pêşniyara avakirina, heremên parastinê yan ên ewîetiyê li ser axa welatê me, leyistikekê li hember îraqê ye. Em vê pêşniyarê qebûl nakin û em ê bi hemû imkanên xwe ve îi hember derkevin. Ev mudaxeîa pirsên hundurî yê welatekî ye. Di

destûr YN de rê ji karekî wueha re tune ye .Bê daxwaza me tiştekî weha nabe û em jî /i dij in.

BÎRYARA 688 A YEKÎTÎYA NETEWAN

*Komîta Ewîetî ya Rêxistina Yekîtiya Netewan êrîşên îraqê yê îi dij geiê Kurd ê siwil protesto dike.

*Ew êrîşên îi hemberê gelê Kurd, tehlîkeyeke mezinin ji bo aştiya dinyayê û ewîetiya herema Rojhiîata Navîn.

*Dinya divê alîkariyeke mezin ji bo, miîyonan penaberên Kurd birê bike.

*Êrîşên li hemberê siwilan pêwist e, bên rawestandin û tû êrîş neyên ser alîkariya ku ji bo penaberên Kurd re dibe.

Li hember biryara 688 a YN sê dewîet - Kuba, Zîmbabwe û Yemen- rabûn û dengên xwe îi dij bi kar anîn.

Du dewlet - Çin û Hindistan- ,bêdeng man.

Deh dewlet jî,di nav wan de DYA, YKSS, Fransa, Brîtanya, Ekwador û hwd. /z gel biryarê deng dan. Her weha rê, ji bo biryarên nû li ser pirsê vekirî hat hiştin.

DÎTINA NATO

NATO di civîna xwe de /i ser kirin û bûyerên Iraqê rawesta. Bi awakt giştî NATO êrîşên îraqê yên li dij geîê Kurd protesto kir û nerazîbûna xwe anî zimên. NATO, diyar kirin, ku ev êrîş pêwist e bên rawestan, ji ber ku, ew

175

tevayiya aştî û ewletiya heremê dixe bin tehdîdek mezin. WeJce daxuyaniyek resmî jî ev tişt hate beîav kirin.

'19ê Nîsanê

Ji bo alîkariya penaberan, Amerîka 5 hezar leşker daxiste Kurdistana Bakur ser sînorên Tirkiye ii Iraqê. Li gor niiçegîhan ii fotografên ku di rojname ii TV yan de belav

dibin, rewşa penaberan gelek xerab e. Ji birçîbiin ii sermayê bi kêmasî rojê 500 kes dimrin.
Di bin serokatiya qumandarekî Amerîkî de, heyeta dewletên Hevkar, bi 6 saatî dereng çii bajarê Dihokê ii li wir bi qumandarê îraqê re, li ser rewşa penaberan civînek pêk anîn. îraqê paş ve gav avêt ii berpirsiyarê heyeta îraqê got ku; "em nahatine bazariyê. Em hatine guhdariya heyeta dewîetên Hevkar bikin û ji wan, di derheqê penaberan de agahdarî bigrin".
Rojnamevanê Kurd Tahir Hewremanî, di dema şerê pêşmerge ii Iraqê de, bi xwe di nav şer de bii ii fotografên şer girtibii. TV' ya Swêdê ji van menzereyên şerê çend perça şan da ii bi T. Hewremanî re li ser rewşa şerê germ hevpeyvînek çêkir.
Serokê Parastina Rêxistina Zarokan yên Kevin ii Endamê Komîta Kurdan ya Parastina Mafê Kurd Thomas Hammarberg, di TV a Swêdê de, U ser rewşa penaberan rawesta ii daxwazeke acîl ji Swêd ii cîhanê kir ku rojek berê xwe bigêhênin penaberan. Herweha Serokê Rêxistina Parastina Zarokan yê nii jî, ji Kurdistanê, ji herêma penaberan dihat ii di TV de, belengazî ii trajediya zarok ii penaberên Kurd anî zimên.
Federasyona Komeleyên Kurd li Swêdê, di derheqê organîzekirina rêxistin ii kesên Kurd ii Swêdî de, ji bo Kurdan daxuyaniyek belav kir. Di daxuyani ya xwe de, ji hemii komele, rêxistin ii kesan daxwaza xebateke aktîv ii rêxistî ya merkezî kir.

Heyeta Kurd çû Bexdayê
'20ê Nîsanê
Berpirsîyarên Partiya Demokrata Kurdistana Iraqê li
Şam ii Londrayê dan dîyar kirin, ku Bereyê Kurdistana
îraqê di bin serokatiya Celal Talabanî de, Nêçîrvan niinerê
PDK-Iraqê, Samî Abdurrahman serokê Partiya Gel, Resiil
Mamend Serokê Partiya Sosyalîst heyetek şandine
Bexdayê ku bi Saddam re daniistandinan pêk bînin) .
Paşê dîyar bii, ku Saddam di binî de bi Kurdan re têkiliyan
danîye. Redaktorê kovara Armancê Murad Ciwan piştî
guftiigoyan çiibû Kurdistanê û dema vegerîya, di Kovara Armanc
hejmara 121'ê de bi semivîsa " Gerrek li nav Şêrebirîndarên
Warwêran -2" de, li ser vê babetê de weha dinivîse:
"Hê di destpêka biserketina serthiîdanê de, Mukerrem Talahanî,
ku wezîr e di hukimeta îraqê de û heta çi tekîîfên rejtma
Iraqê bûne wî bi xwe anîne ji Kurdan re, hat Kurdistanê, Ceîaî
Talabant û Mesûd Barzant dîtin, da dîyarkirin ku Saddam
Huseyîn teklîfa guftûgo û lihevhatinê îi Kurdan dike.
"Saddam Huseyîn dibêje" got Mukerrem Taîabanî " ji cudakirina
Kurdistanê pê ve Kurd çi bixwazin em hazir in bi wan re
guftûgo bikin." Serokên Kurdan fikirîn ku teklîf, teklîfeke baş bû.
Kurdan ji xwe cudakirin û serxwebûna Kurdistanê nedixwestin, ev
yek di rewşa îro ya herêmî û cîJwnê de mumkun ne didîtin....
Lê baweriya wan bi Saddam nedihat, têr îqna nedibûn ku
Saddam ji dil wê Jwzir be, ku pirsa otonomiyeke rastir yan cumhuriyetek
federdîî bi wan re munaqeşe bike û qebûl bike. Loma,
xwiya bû tenê bi hatina Mukerrem Taîabanî diîê wan îi cîh
rûnedinişt, xwestin heyetekê bişînin Bexdayê, ew raste rast ji

devê hukimetê û ji yê Saddam tekîîfê bibihîzin.
Heyetek ji du kesan: endamê Mekteba Siyast ya PDK Faziî Mutnî û yê YNK Feridun çûn Bexdayê û vegeriyan hatin, gotin; rast e hukimetê ji me re gotiye ku, em hazir in rûnin, her tiştî bi Kurdan re munaqeşe bikin û pirsa Kurd ji binî ve safî bikin".
177
Li gor ajansan, U ser gotina Saddam heyet çiiye Baxdayê.
Dîsan li gor niiçeyên ajansan, Kurd dixwazin peymana '1970î pêk bînin.
Em dîsa guhdariya Murad Ciwan bikin:
...."guftûgoyan dest pê kir. Erê guftûgo resmî bû, îê hemû civîn, çi bi endamê hukimetê re, çi jî bi Saddam re li ser esasên çarçawên giştî dimeşiyan û şîfayî bûn. Zebt nedihatin girtin. Pirs bi berbiçavî, xal bi xaî nedihatin munaqeşekirin. Li ser çerçewa otonomiyê û demokrasiyê dihat axaftin.
Heyetê digot, Kurd tiştekî naxwazin, ji bilî otonomiyeke heqîqî. Saddam li wan vedigerand:
-Heîbet, heîbet ji xwe ne hewce ye em bi dûr û dirêj munaqeşa vê yekê bikin. beyana 11 'ê Adarê berî bîst saîan di navbera me de hatîye îmzakirin. Yê ku ew beyan qebûl kiriye, ez bi xwe me. Em îro hazir in ku beyana 11 'ê Adarê bi guhartinek ber bi pêş de qebûî bikin. Ji beyanê xnr de 20 sal derbas bûne, divê ev dem jî bê hesablcirin û pêşketin tê de bên qebûîkirin. Em hazir in ji beyana ' 11ê Adarê zêdetir bidin.
Heyetê digot: Me divê demokrasî û azadiyek fireh li Iraqê hebe. Saddam peyva wan di devê wan de dibiri, digot:
-Lê çawa! Hîn berî ku hûn bêjin em hi xwe hazir in ku demokrasiyek heqîqî bînin Iraqê. Ne ku niiia, hê ji berê de hukimeta me li

ser vê meselê rawestîyaye"...
Mirin ii perîşaniya Kurdên penaber li ser sînorên Tirkiye -îraq ii îraq ii îranê her berdewam e. Ji bo alîkariya penaberan leşkerên Amerîkî îro gehîştin Hekariyê. Pênc hezar leşkerên Amerîkî derbasî Kurdistana îraqê biin. Helîkopterên şerê, leşker ii helîkopterên barkêş diparêzin. Ew dê Kurdên penaber ji çîyan daxin jêr ii wan di nav bajarên kon de, bi cîh bikin. Bidhkirina penaberan re, dê leşkerên Amerîkî ji herêmê derkevin ii cîhên xwe dewrê hêzên Koma Neteweyan bikin.
Ji aliyê din ve, Amerika pirda Xabiirê ku di dema şer de xira biibiin, îşev temam dike ii di ser riya papiirê re jî, dê
178
aUkariya penaberan bike.
Tirkiyê biryara Parlementoya Ewropê bi tiindî protesto kir. Wek ku tê zanîn do Parlementoya Ewropê di derheqê Kurdan de 2 biryar girtibii. Yek, divê di her perçeyî de mafê Kurdan yê kulturî bêt dayîn. Dudo, divê bi lez ii bez ji penaberên Kurd re aUkarî bê kirin. Di vî warî de daxuyaniya Tirkiyê weha ye:
"Di qaniina me ya bingehîn de, hilbijartineke azad heye. Mafê her kesî wek hev e. Lê, cîhê parvekariyê ii parvekaran tune. Welatê me yek e ii nayê parçe kirin. Di hêla penaberan de jî yekî qasî me wezîfeyê xwe yê humanîstiyê bi cîh ne aniye" .
Federasyona Komeleyên Kurd, Komîta Kurd ya ji bo Parastina Mafê Gelê Kurd li Swêdê ii Komîta sîyasî, U Kunstragêrdên civînek pêk anî. Qasî 500 kes di civînê de

beşdar biin. Ji bo penaberan ji hukimeta Swêdê ii gelê Swêdê alîkarîyê xwestin. Li ser rewşa penaber ii Kurdistanê agahdarî dan. Ji bo aUkariyê pere berhev kirin. Li ser rewşa penaberan bi kurdî ii swêdî belavok hatin belav kirin. Hinek beşdarên civînê çiindina heyeta Kurd a Baxdayê protesto kirin. Qîriyan:

-Celaî û Mesûd bi Saddamê faşîst re danenişin!

'21ê Nîsanê

Leşkerên Amerîka ii yên îraqê li ser avakirina kampên penaberan li hevdu kirin. Lê, li gor peymanê divê îraq leşkerên xwe ji hêla Zaxo diir bixistan. Dema leşkerên Amerîkî ji bo avakirina kampan çiin nêzî bajarê Zaxo, li wir rastî poUsên îraqê yên çekdar hatin. Li gor daxuyaniya leşkerên Amerîkî, li Zaxo ji 200'î bêtir polîsên îraqê hene ii li nav bajêr digerin. Dema leşkerên Amerîkî wan dîtin, matmayî man. Li gor peymanê divê li wir kesên çekdar nemana.

179

Li kampa Hekariyê penaberan êrîşî kamyonên nan kirin, leşkerên Tirk berê tifingên xwe dan hewa ii teqandm ii paşê jî dan nav penaberan ii bi wan vedan. Penaberek mir ii 5 kes birîndar biin. Penaberan li ser vê biiyerê leşkerên Tirk dan ber keviran.

Leşkerên Amerîkî ii yên îngilîz Kurdan dişibînên sehoran)piliiran,simore). Dibêjin; "Kurdên penaber niha ji ser çiyê danakevin. Em dê, bi heUkopteran nan bavêjin wan ii hêdî hêdî nan berjêr bavêjin, ew dê li diiv nan dakevin kontarê çiyê ii pêre jî dakevin rastê".

Li gor agahdariyên leşkerên Hevkar Kurd bi Saddam bawer nakin ii paşve venagerin.
Wezîrê Kariibarê Derveyî yê îranê AU Ekber Welayetî, bi awayekî vekirî U dij avakirina kampên nêzî sînorê Iraq ii îranê der ket ii got:
-Em naxwazin li nêzî sînorên me kampên penaberan çêbikin. Û herweha em li dij perçekirina îraqê ne jî.
Li gor ajansan, li başiirê îraqê Şu bi taktîkên gerUIayî şerê xwe didomînin. Lê Kurd, ji bo lihevhatinê ii peyman pêk anînê li Bexdayê ne.
îro serokê hêzên Hevkar yê şerê Kuweyt ii îraqê General Norman Schwartzkopf Schartkopf vegeriya Amerîka mala xwe. Ew dema li Florîda ji balafirê daket jin, keç ii kiiçUcê xwe hembêz kir ii ji TV re got:
-Min pir bêriya jin, keç û kûçikê xwe kiribûn.
'22ê Nîsanê
Ji sînorê Tirkiyê 5 km bi hundir ii 2 km re jorê Zaxo Amerîka ii leşkerên Hevkar cîhên kampan çêkirin. Kamp di nav leşker ii polîsên îraqê de tên avakirin. Xelk bawer nake ii naxwaze herin wan kampan..
Bi helîkopteran, ji Silopiyê rojê 40 car eşya dibin cîhê 180
kampan. îro bi helîkopterên Amerîkî 60 rojnamevan jî çiin cîhên avakirina kampan ii paşê bi otomobîlan çiin nav bajarê Zaxo. Li gor niiçegîhanê BBC Ragip Duran, li Zaxo polîsên îraqê cirît davêjin. Berî şer nifiisa bajarê Zaxo 200 hezar biin, lê, îro qasî 10 hezar kes li wir maye. Ew jî Areb, Suryanî ii Tirkmen in. Ji derî çend kal iî pîran

hema hema Kurd tunin. Xelk ditirse, newêrin qise biîdn.
Wezîrê Parastinê yê Amerîka Dick Cheney daxuyanîyek
da TV ii got:
-Ji bo aUkariya avakirina kampan ii penaberan leşkerên
îraqê ji leşkerên me re gelek dibin alîkar ii hemii
îmkanên xwe pêk tînin. Bi kamyonên xwe ve amadene ii
di çiyayên bê rê de, rê şanê leşkerên Hevkar dikin.
Li gor BBC heyeteke Kurd li Amerîka ii yek jî, li
îngiliztanê bi berpirsiyarên Wezîrên derveyî yên
Amerîka ii yên îngiUztanê re riiniştin ii li ser pirsa Kurd
axaftin.
Li Tahran ii Londrayê serokên Şîîyên îraqê, çiindina
Kurdan a Bexdayê protesto kirin ii daxuyanî dan ku:
"Wek muxalefeta îraqê, em du car bi Kurdan re
rûniştin û me hemûyan dîyar kir ku 'bi Saddam re
rûniştin nabe. Peyman nabe. Ji ber ku mirov nikare bi
Saddam bawer bike. Niha serokên Kurdan rabûn çûn
Bexdayê ba Saddam. Saddam ketiye tengasiyê. Ji ber vê
yekê jî, ew dixwaze bi Kurdan re rûne û li hev bê û giraniya
şer bide ser Şîîyan. Dema îcarê Şîîyan tewa bike, vê
carê dê dîsan vegere ser Kurdan".
îro çend roj in, ku Celal Talabanî bi heyeta Bereyê Kurdistanê
ve li Bexadayê ne ii bi Saddam re, li ser peymaneke
aştiyê riiniştme. Lê, tii agahdariyek di vî wari cie tune.
Li gor texmînan, dibêjin; "Kurd dixwazin peymana 11'ê
Adara 1970'yî piçek berfireh bikin. Bajarê Kerkûkê jî bikin
nav sînorên otonomiyê".
181

Peymana 11 ' ê Adarê ya 1970'yt

- 1Di heremên ku piraniya rûniştvanên wan Kurd in, zimanê kurdî îi geî ê erebî dê bibe zimanê resmî; herweha zimanê kurdî di van herêman de dê bibe zimanê perwerdekirinê. Ji dervî vê îi cîhên din ên li Iraqê, zimanê kurdt di çarçova Qanûna bingehîn de dê wekî zimanê duwem bête xwendin.

- 2Ji bo ku birayên me yên Kurd di jîyana îdarî de cîh bigrin ; di nav de wezîrtî, serokatiya leşkerî û hwd. di cîhên taybetî û giring jî, di hemû karên îdarî de tu ferq û cûdabûn di navbera Kurdan û yên din de neyinkirin. Ev armancek girîng a Hukimet a Şoreşê ye, ku dixwaze pêk bîne. Gava Hukimet a Şoreşê vê biryarê digre ; ji bo bicîhkirina vê biryarê bi awakî edîi divê kar bên kirin û herweha îi gor hejmara brayên me yên Kurd, ku berê tehda li wan hatiye kirin jî, îi ber çav bêt girtin.

- 3Ji bo paşvemayîna di warê kuîtur û perwerdekirinê de yên neteweyê Kurd ji hoîê bête rakirin dê pîan û proje bêne amadekirin û di pêkanîna wan de, dê ev xaî îi ber çav bêne girtin:

A - Ji bo mafên geîê Kurd ên ziman û kuîturî di radyo û televîzyonê de program bêne amadekirin û ji bo amade û îdarekirina kar û baran Konseya Şoreşê, ku ew bi Dezgeha Giştî ya Kuîtur û înformasyonî ya Kurd ve bên girêdan, zûtirîn dem bikeve jîyanê.

B - Ji ber rewşa tehdayiyê di heremê de şagirt û xwendekar, ku dev ji xwendina xwe berdabûn, bê
182
ku li emrê wan bê meyzeîcirin dîsa dest bi xwendina xwe bikin û qare ji problemên wan re bêne dîtin.
C - Di herêma Kurd de hejmarek zêde dibistan bêne vekirin. Dê hingava (sewiya) xwendin û perwerdekirinê bê bilind kirin. Xwendevanên Kurd bi awakî edîl di unîwersîte, zanîngahên leşkerî , dezgehên lêkolînî û dibistanên pîşeyî)meslekt) de bên qebûl kirin.
- 4Di herêmên, ku piraniya rûniştvanên wan Kurd in dê karmend ji nav Kurdan bêne hilbijartin, ku di nav Kurdan de bi awayê tê daxwazkirin karmend tûnebin, hingê dê karmend ên bi zimanê Kurdî bizanibin bên. Herweha walî, qeymeqam, mudirê polîsan û mudirên ewletiyê û ji bo karên din jî yên girîng karmend ji nav Kurdan dê bên hilbijartin. Di herêmê de yekcar dê dest bi avakirin û pêşxistina mekanîzm a dewletê bê kirin û ev kar, li gor bicîhanîna biryarnameyên komîteya bilind a ku dê çavdêriya vî kar û barî bike, bi awayekî parastina yekîtiya netewî û ewletiyê bê pêk anîn.
- 5Hukimet, mafên gelê Kurd, ku rêxistinên xwe yên xwendekaran, rêxistinên ciwanan, rêxistinan jinan, yekîtiya mamosteyan û

dezgehên din ê taybetî deyne û qebûî dike. Ev dezgeh dê bibin endamên dezgehên wekî yên Iraqê.

- 6A - Xaîên 1 û 2 yên biryara bi hejmarên 59 ji 05. 08. 1968 - an heta beîavkirina vê daxuyaniyê dê derbas bibin û ev xal dê hemû kesên ku di herema Kurd de beşdarê tehdayiyan bûne bigre nav xwe.

B - Karkerên siwîî û her weha yên îeşkerî, kar-
183
mend dê dîsa bi paş ve vegerin karê xwe û ev kar bê girêdayiya tu formalîtan dê bê destpêkirin. Ji sivtlên di herema Kurd de, li gor pêwistiyan alîkarî bê xwestin.

- 7A - Ji bo ku di demek herî zû de pêşketin di herema Kurd de, di hemû waran de bête pêk anîn, ji bo ku rewşa zehmet a hatî serê gelê Kurd di saîên dawî de bê teîaft kirin, ji pisporan heyet bêne danîn û ji bo bicîhkirina van karan butçeyek bête veqetandin û ev heyeta hatî danîn bi wezareta karên bakûr ve bête girêdan.

B - Ji bo ku herêmên cuda yên Iraqê, bi awayek girêdayê hev pêşbikevin, planên aborî bêne amadekirin û tê de bi awayek taybetî balkişandin li ser herema Kurd hebe.

C - Ji bo şehîdên tevgera çekdarî ya Kurd û yên din, ên ku di şerê ne bi dil ketin û yên ku di vî şert de seqetbûn yan bi newxeşiyên giran ketin, bi

xalek nû ya qanun a niha û maeşên teqawidê bên girêdan.
D - Ji bo kesên ku zerar dîtin e û hejar ketin e, alîkarî dê bête kirin. Ev aîîkarî bi avakirina avayiyan, ji bo bêkaran dîtina kar, aîîkariya aborî, tazmînatê ji bo kesên zerar dîtî - dê bête kirin. Ev kar jî dê di destê komîteya bilind de be. Kesên dikevin xalên berî vê, dê ji vê xaîê îstîfade nebînin.
- 8Vegerandina gundî yên Kurd û Ereb ser cîh û warên wan ên berê. Lê, cîhên ku niha jiyan di wan de bê îmkan e û dervî cîhên ji alî hukimetê ve li gor qanûna bingehtn ji bo berjewendiya giştî bêne bi kar anîn, dest li ser wan hatiye danîn, dê rûniştvanên van cîyan di gundên herî nêzîk de bên bi cîh kirin. Xesar a ku dê bibînin jî dê îi wan

bê vegerandin.
- 9Ji bo ku di herema Kurd de qanûn a reforma erdê pêk bê, dê kar û bar bi awayekî zû bêne kirin., ku ev reform pêwendiyên feodalî bişktne û hemû gundî dê wekî hev ji vê qanûnê îstîfade bibînin. Ji dervî vê, dê baca(vergt) bi salan li ser gundiyan kombûyî ji ber rewşa şer dê bêne efûkirin.
- 10Ji bo ku qanûna bingehîn a demî, bi vî awayî bête gûherandin levhatin û peyman hatiye peyda kirin.
A - Gelê Iraqê bi taybetî ji du neteweyan pêk

tê. Ev her du netewe - neteweyê Kurd û neteweyê Ereb in. Ev qanûna bingehîn mafên netewî yên gelê Kurd û yên mînorîtet di çarçova yekîtiya Iraqê de qebûl dike.

B - Ev xal dê bi noqteya 4 - an a qanûna bingehîn ve bê girêdan:

Di herema Kurd de zimanê Kurdî dê erebî, bibe zimanê resmî.

C - Ev gûherandin, dê di qanûna bingehîn de bi awayekî mayî (daîmî) jî bimîne.

- 11Vegerandina çekên giran û dezgeha radyoyê ji bo hukimetê, dê li gor pêkanîna hemû xalên vê peymanê ve bête girêdan.
- 12Ji alîkarên Serokkomar yek dê Kurd be.
- 13Qanûna wîlayetan girêdayî naveroka vê peymanê dê bête guherandin.
- 14Piştî beîavkirina vê daxuyaniyê, Komîteya Bilind a ku dê çavdêriya pêkanîna biryarên di vê daxuyaniyê de bike, pê re girêdayî dê li gor statîsttkên resmî, herêmên ku Kurd tê de zêde ne îdareya wan bighîne hev. Dewlet dê vê yekîtiyê pêşbixe û di van herêman de hemû mafên gelê

185

Kurd nas bike, ji bo ku bibe xwedî îdareyek otonom dê van mafan bigre bin garantiyê. Heta ku ev yekîtiya îdart peyda bibe, dê di nav komîteya bilind û waliyên herêmên bakûr de civîn bi awayek perîyodîk dom bikin û kar û

barên girêdayî bi neteweyê Kurd ve dê bên koordîne kirin. Ji ber ku îdareya otonom dê di nav Komara Iraqê de pêk bê, bê guman bikaranîna dewîemendiyên tebîî jî dê girêdayê îdareya vê komarê bin.

- 15Gelê Kurd, li gor hejmara xwe di nav nufûsa Iraqê, dê bibe xwedî berpirîyariyên qanûnî.

'23ê Nîsanê

Leşkerên Amerîka ii yên Hevkar ji alîyekî ve xebata xwe ya çêkirina bajarên konan didomînin ii ji aliyê din ve jî, dixwazin Kurdên penaber bidin bawer kirin, ku ew vegerin bajarên konan ku di nav leşkerên Saddam de çêdikin ii hêzên Saddam dê zerarek nede wan. Ji ber vê yekê, li ser pêşnîyariya Tirkiyê, niha Amerîkî penaberan tespît dikin, ku kî ji Bajarê Zaxo ne wan paşve bişênin. Lê, Tirkiye di pêşniyariya xwe de dibêje ku; "ew penaberên ku ji jorê paraleîa 36-an hatine, divê bi paş ve vegerin malên xwe. Ji ber ku ev herêm di bin kontroî û berpirsiyariya hêzên Hevkar de ye".

Lê, Kurd ji rejîma Saddam bawer nakin ii naxwazin paşve vegerin, an jî herin ew kampên ku Amerika di nav leşkerên Iraqê de, an jî gelek nêzî leşkerên îraqê çêdikin cîhwar bibin. Kurd dibêjin; "ew polîsên ku li Zaxoyê ne, ne polîs in. Ew leşkerên Saddam ên taybetî ne ii wan cilên

leşkeriyê ji xwe kirine ii di şiina wê de cilên polîs li xwe kirine".

Amerîkî ii leşkerên hêzên Hevkar ji leşkerên îraqê gelek razî ne.
îraqê bi nameyekê, serî li Koma Neteweyan xist ii hatina leşkerên Amerîkî ii yên Hevkar protesto kir ii ji Koma Neteweyan xwest, ku rojek zii ew leşker ji axa îraqê derkevin. îraq dibêje ku; "ev karê Amerîka ii hêzên Hevkar, karekî tecawizî ye. Welatê me perçe dikin".
Koi^solosê Sovyetê yê Ankarayê daxuyaniyek da rojnama Cumhuriyetê ii di daxuyaniya xwe de, U dij mudaxela Amerîkayê rawesta ii got; "ev mudaxeîa nav karê Iraqê ye. Divê Amerîka leşkerên xwe ji îraqê bi paş ve bikşîne û hêzên Koma Neteweyan bên şûna wan".
Heyeta Kurd li Bexdayê kariibarên hevdîtinê bi hukimeta Iraqê re didomîne. Li gor berpirsiyarê Bereyê Kurdistana îraqê yê Londrayê, li Bexdayê daniistandin bi pêş ve diçin. Daniistandinên Kurdan li Bexdayê di sewiyeke gelek bilind de çêdibin. Lê, nabêjin heyeta Kurd dîrekt bi Saddam re daniistandin pêk tînin, an bi kesên din re. Ev ne zelal e. Dîsan Berpirsiyarê Bere dibêjin ku; " têkoşîna çekdarî pirsa me çareser nake".
Li gor gotinan, welatên Ewropa baweriyê dane heyeta Kurd ku dikarin bi selametî herin Bexdayê. Dîsan tê gotin ku Saddam li hember her 4. endamên heyeta Kurd 4 mirovên xwe yên giregir, li herêma Hewlêrê wek rehîne teslîmê hêzên Kurd kirine.
îro jî liderên Şîîyên îraqê rexne li lîderên Kurd girtin, ku ew çawan çiine ba Saddam ii pê re guftegoyan dikin.
Wezîrê Derveyê Amerîka J. Baker ji bo aştiya Rojhilata

Navîn xebatên hevdîtinî didomîne. Pişti çiindina Suriyê, ew dixwaze here Sovyetê. Baker, ji bo aştiya Rojhilata Navîn gelek giringî dide Sovyet ii dixwaze di maseya hevdîtinên aştiyê de, serokatiyê bide Sovyetê.

187

Helmut Kohl biryar girt, ku hêzên xwe yên îstîhkam ji bo alîkariya penaberên Kurd bişêne îranê. Amerîka jî dixwaze hêzeke biçiik bişêne îranê.

'24ê Nîsanê

Di bin serokatiya Celal Talabanî de heyeta Kurd li Bexdayê bi Saddam re li ser hin maddeyan li hev kirin. TV yên cîhanê fotografên Saddam ii heyeta Kurd ku dema hevdu ramîsan weşand. Ramîsana endamên heyeta Kurd ii Saddam, Kurd ii bîyaniyan matmayî hişt.

Celal Talabanî li Bexdayê preskonferansek çêkir. Serokê heyeta Kurd Celal Talabanî, di konferansê de, dîyar dikir ku; " bi îraqê re peymana lihevhatinê pêk anîne. Li ser gelek prensîban li hevdu kirine. Di vê peymanê de, li ser avakirina rejîmeke demokratîk li îraqê, azadiya çapemeniyê, avakirina partiyên legaî û piralî û otonomiya Kurdan a ll'a Adara 1970'î li hevdu kirine. Lê, ev hîn xebatên pêş in. Dê bi firehî li ser vê peymanê xebat bikin û di dawiyê de Mesûd Barzanî jî peymanê îmza bike" .

Lê, li gor ajansan, hîn sînor ii çarçova otonomiyê ne dîyar e.

Berpirsîyarê hukimeta îraqê Dr. Amelbarî jî, di derheqê peymanê de daxuyaniyek da ku; " qad û çarçova otonomî geîek demokratîk û berfireh e. Nêzî serxwebûnê ye. Divê

ev ji bo îran û Tirkiyê jî bibe mînakeke baş" .
Ji aliyên din ve, Kurdên penaber ên bi hêzên Kurd re girêdayî peymanê baş dîtin. Lê, yên serbixwe yên ku ne nêzî tii rêxistinekê ne, bi Saddam bawer nakin.
188
PÊŞNÎYARA OTONOMIYÊ
)Wek ku tê zanîn delegasyona yekemîn bê pîan û proje çûbûn Bexdayê. Piştî vegara Bexdayê, Kurdan di nav xwe de civîn çêkirin û vê pêşnîyara proja han bi xwe re birin Bexdayê. Deîegasyona duyemîn, di bin Serokatiya Mesûd Barzanî de, ji Samt Abdurrahman, Resûl Mamend, Nûşîrwan û çend kesên din pek hat û delegasyon cara duyemîn çû Bexdayê. Dlegasyon 42 RoJ li Bexdayê ma. Di van 42- rojan de, tû deng û agahdari ji delegasyon û hêzên Kurdan dernediket(.
Beşê yekem: Bingehê otonomiyê
Beşê yekem: Bingehê gişti
Madde 1: a) Li gor vê qanûna herêma Kurdistanê xwediyê otonomiyê ye û navê wê "Herêm" e.
b) Herêm ji wîlayet û yekîtiyên îdarî yên ku piraniya hemwelatiyên wan Kurd in pêk tê û bi mercê ku dokumentên serhejmara gişti ya ' 1977an bibe bingehê ser hejmara gişti ya ku di pêş de wê bê kirin, sînorê herêmê tespît dibe.
c) Herêm yekîtiya îdariya yekgirtî ye, xwedî şexsiyetek manewî ye û di çarçowa yekîtiya Komara Iraqê ya destûrî, sîyasî û aborî de hukmê

wê yê otonomî heye. Dabeşbûna îdarî ya otonomiyê bi mercê ku hukmê vê qanûnê îi ber çav bê girtin, îi gor qanûna wîîayetan pêk tê.
d) Komara îraqê ji yekîtiya sîyasî ya du neteweyên bingeh; Ereb û Kurd û mînorîtetên netewiyên bira pêk tê.
e) Hemweîatiya Komara îraqê yek e û hemû hemwelatî xwediyê maf û erkên wekhev in.
189
(/Komara îraqê xwedî yek alî û sembolê ye. Qanûna alê û sembolê bi awayekî ku avabûna pêkhatina netewiya Komara îraqê nîşan bide, tê guhartin.
g) Navendiya wîlayeta Kerkûkê peytextê Herêma Kurdistan a Otonom e.
h) Dezgehên otonomiyê parçekî ji dezgehên Komara îraqê ne
Madde 2 : a) Zimanê kurdî li herêmê li gel zimanê erebî zimanê resmî ye.
b) Li herêmê zimanê perwerde û hîndekariyê kurdt ye û hînbûna zimanê erebî di hemû qonaxên hîndekarî û perwerdê de mecbûrt ye.
c) Wargehên perwerde û hîndekariyê ji Ereban re tên vekirin ku hîn bûn bi zimanê erebî ye, hînkirina kurdî jî di van deran de mecbûrî ye. Herweha wargehên hîndekariyê li her çar aliyên îraqê tên vekirin ku hînbûn di wan de ji bo Kurdên li wan ciyan bi zimanê kurdî ye û

hînbûna zimanê erebî di wan de mecbûrî ye.
d) Li herêmê, hîndekariya ji bo mînorîtetan bi zimanê wan e û zimanê erebî û kurdî jî mecbûrî ye.
e) Hîndekarî, /i herêmê di hin" qonaxên xwe de dikeve bin sîyaseta pedagojî û hînbûna gişti ya dewletê.
f) Divê taybetiyên netewî, jêbermayî û toreyên neteweyê Kurd û yên mînorîtêtên din li gor qanûna ku parlementoya herêmî datîne, di sîyaseta hîndekariyê de bên parastin.
g) Para herêmê di bursên xwendinê yên ji bo zanîngeh (unîversîte) akademiyên leşkerî de li gor nîsbeta nufûsa herêmê tê dîyarkirin û
190
pêşnîyarkirina xwendevanan ji aliyê dezgehên berpirstyar ve /i gor qanûnên heyt pêk tê.
Maddeya sêyem: a) Neteweyê Kurd îi gor nîspeta nufûsa xwe beşdarî hukim dibe, herweha navendiyên hesas û girîng jî tê de di hemû dezgehên dewletê de tê temsîl kirin. Nûnerên wî jî beşdarî biryarên îraqê dibin.
b) Neteweyê Kurd li gor nîspeta nufûsa xwe di parlementoya navendî de tê temsîl kirin.
c) Alîkarê serokkomar Kurd e.
d) Li herêmê li gor destûr û biryarên ku ji bo vî îcarî hene, maf û azadiyên Ereb û mînorîtetan parastî ne û desthilata otonomiyê xwe dide ber

parastin wan.
e) Li herêmê xelkê Ereb û mînorîtet, /z gor
nîspeta nufûsa xwe di hemî dezgehên otonomiyê
de beşdar dibin û herweha di navendiyên
giştî de /z' gor qanûn û biryarên ji bo vt karî derketine,
dikevin wezîfe. Û Kurd jî li yekîtiyên
îdarî yên ii dervayî Herêma Kurdistanê ku lê ne,
temsîl dibin.
Madda çarem: Li herêmê biryarên dadgehî
serbixwe ne û tû desthilatiya gayrî qanûnê di ser
re tune, perçek e ji dezgeha adlî ya Komara îraqê,
bi mercê ku taybetiya Kurdistanê wek herêmek
îstîsnayî li ber çav bê girtin.
Beşê duyemîn: Butça Giştî ya Herêma Kurdistanê
Madda pêncem: a) Herêma Kurdistanê xwedî
butçeyeke taybetî ye ku bi ser butça giştî ya
yekbûyî ya dewletê ve ye. Ji van butçeyên îiqê pêk
191
tê ku li jêr tên:
-1Butça salê
-2Butça plana hukimeta herêmî ya avakirin
û pêşdexistin.
-3Butça dezgeh û sazgehên berhemdariyê
yên ku li herêmê hene û ên ku di pêş de dê bên
avakirin.
-4Deyn û alîkarî
b) butça Giştî ya herêmê ji çavkaniyên jêr
dertê:

-1Para Kurdistanê ji berhemên petrola ku tê texsîskirin ji bo planên pêşveçûna avabûna netewî li gor nîspeta hemwelatiyên herêmê.
-2Parek ji butça salê ya peryodîk li gor nîspeta hemweîatiyên herêmê, bi awayekî ku texsîsatên para sazgehên navendî, parîementoya navendî, meclisa wezîran, parastin û karûbarê derve, petrol û madenan berî ku belakirnê ji butça welêt derkeve.
c) Pêwîstiyên planên pêşvebirina herêmê ji hatinên girêdayî bi tiştên ku îi jor hate gotin, pêk tê. danîn û lihevanîna butça herêmî her li gor vê qaîdê û bingehên butça giştî ya dewletê pêk tê.
d) Qanûnek ji bo detayên bingeh û prensîbên ku îi jor hatin gotin û xas bi butçeya giştî ya herêmî tê danîn.
e) Butçeyek taybetî ji bo nehêîana paşdemayîna Kurdistanê tê danîn.
Beşê duyemîn: Dezgehên otonomiyê
Beşa yekem: Parîemento
Madda şeşem: Herêma Kurdistanê ji aliyê desthiîata parlementoya hilbijartî ku bi navê
192
"Meclisa Teşrîî ya Herêmê" tê binavkirin û tê îdarekirin ji aliyê Organa birêvebirina (OB) hukimeta Otonomiyê ku ji ya pêşîn dertê û navê wê " Meclisa Tenfîzî ya Herêmî" (MTH) ye, îi gor qanûnê û qanûn û urf û edetên din.

Meslîsa Teşrîî ya herêmî
mada heftem: MTH ji çar salan careke ji aliyê xelkê herêmê bi riya hilbijartinên serbest û raste rast tê hilbijartin. Hebûn û nîzama wê û karê hundirê wê bi qanûnekê tê sererast kirin.
Mada heştem: MTH serokekî û aîîkarên wî sekreterekî ji nav endamên xwe hildibjêre.
b) Civînên MTH bi hazirbûna piraniya endamên wê pêk tê û biryarên wê bi piraniya kesên amade tên wergirtin. Lê ji danîna qanûnan re 2/3'ê dengên amade pêwîst e.
Madda nehem: Di çarçova destûr û qanûnê de selaheyetên MTH ev in:
a) Danîna nîzamek daxilî
b) Di çarçowa sîyaseta giştî ya dewîetê de danîna qanûnên pêwîst ji bo pêşvebirina herêmê û lêkirina dezgehên wê yên ekonomîk, civakî, kuîturî, avahî.
c) Danîna qanûnên girêdayî bi pêşvebirina kuîtur, taybetî û edetên netewî yên hemweîatiyên herêmê.
d) Danîna qanûnên taybetî bi risûm, baca herêmê îi gor destûr û bingehên esasî ku di qanûna navendî de hene.
e) Testîkkirina butça salê û ya avakirin û pêşxistina ya herêmê îi gor para ku ji her yekê re hatiye texsîskirin û wergirtina biryarên îi ser hesabên dawî ku wê ji bo biryardanê ji parîementoya

navendî re bê şandin.
193
(/Lz gor daxwaza planên navendî yên dewîetê û daxwazên pêkanîna wan testîqkirina pêşnameyên (tasîakên) projên tefsîlî yên ku Organa Birêvebirê di warê ekonomiyê, avakirinê, hîndekariyê, tenduristî û kar de datîne.
g) Hîn guhartin li ser butça salê ya herêmê piştî testîqbûnê, îi gor wan diravên ku hatine texsîskirin di vê butçê de û li gor armancên wan, bi mercê ku ne li dijî qanûn û planên pêşvebirina dewîetên bin.
h) Gotûbêj bi endamên OB re li ser karûbarên wan.
i) Baweri jêkişandin ji OB yan jî, ji endamekî yan bêtir endamên wê yê ku bawerî jê hat kişandin ji weztfe dikeve. Biryara vekişandina baweriyê bi biryara piraniya endamên MTH pêk tê.
J) Piştî bi cîhetên navendî yên berpirsîyar re muşawere bê kirin û îi gor qanûnên heyî di welêt de MTH qanûnên dezgeh, sazgeh û daîrên nîv resmî datîne.
k) Biryarên guhartinên qanûna otonomiyê.
Fesîa duduyan: Organa birêvebirina otonomiyê)OB(
Mada dehem: a) OB heyeta birêvebirina îdara otonomiyê ya îi Herêmê ye.

b) OB ji serok, aîîkarê wî û ji çend endaman pêk tê ku hejmarên wan wek dezgehên ku di madda yazdan de hatine yan wan zêdetir e.
c) Serokkomar yekî ji nav endamên OB ji bo seroîcatî û avakirina OB tayîn dike.
d) Serokê mukeîîef endamên OB û alîkarê xwe ji MTH yan ji wan kesên ku mercên enda-
194
metiyê di nav wan de hene, hildibjêre û pêşkêşî MTH dike ji bo bawerî pê anîna piraniya endamên meclîsê û fermanek Komarî ji bo avabûna OB derdikeve.
e) Serokê OB wê di derece alîkarê hukimetê yan ya alîkarê serokkomar de be. Endamên OB di dereca wezîran de ne û seîahetiyên wezîrtiyê di warên wan de wê bi wan re hebe.
f) Mafê serokkomar heye ku serokê OB ji wezîfe bigire. Wê çaxê OB tê feshkirin.
g) Gava OB bê feshkirin yan bawerî jê bê şikandin, OB karê xwe didomtne heta ku organa nû di nav pirtirîn 30 rojan de çêbibe.
Mada yazdem: Avabûna organa birêvebirinê)OB(
a) Serokatiya organa Birêvebirinê û pê ve
-1BuroyaOB
-2Buroya teftîş û tehqîqê.
b) Riya avakirina van buroyan li gor nîzamekê tê sînorkirin, ku OB hazir dike.

c) Meclîsa plankirinê (MP) ya herêmî ya ku riya avakirina wê û selahiyetên wê bi qanûnek herêmî yan bi destûreke ku ji aîiyê OB hatiye danîn tê dîyarkirin, girêdayî OB ye û ev mecîîs bi hevkariya MP ya navendî re karê xwe dike.
d) OB berpirsiyariya dezgehên jêrîn dike.
-1Emîrdariya giştî (wezareta otonomiyê) ya hîndekariyê û xwendina biîind.
-2Emîrdariya giştî ya îskan û avayiyê.
-3Emîrdariya giştî ya çandiniyê û reforma ziraî û avdaniyê.
-4Emîrdariya giştî ya îcarûbarên hundirîn ku wîlayetan, poîîs û parastina sivîî, nufûsê û ewleyiya herêmt digire nav xwe.
195
-5Emîrdariya giştî ya ragîhandin û neqlîyatê.
-6Emîrdariya giştî ya kultur û ciwaniyê.
-7Emîrdariya giştî ya karûbarên belediyê û gundan.
-8Emîrdariya giştî ya seyahet û turîzmê, hêsabûnê.
-9Emîrdariya giştî ya karûbarên civakî, tenduristî û îcar digire nav xwe.
-10Emîrdariya giştî ya maîiya ekonomiyê, bi îcarûbarên maîî û tîcareta hundirî û ebûrê mijûl e.
-11Emîrdariya giştî ya edlîyê û ewqafê.
-12Emîrdariya giştî ya sinayiyê ku mijûl e bi

avakirin û birêvebirina dezgehên sinaî /z herêmê ji xeyrî derxistina petroîê û madenan ku karê hukimeta navendî ne.

-13Emîrdariya giştî ya plankirinê. Lêkolîn û statîstîkan datîne, detayan ji pîanên pêşvebirê re, berhemdariya herêmî re, bi hevkarî û lihevkirina li gel wezareta plankirinê di çarçova planên avakirina giştî ya weîat de.

e) Berpirsîyariya wan muduriyetên ku di benda çûyî de hatin dîyarkirin, hîn endamên OB pê radibin, bi navê sekreterê giştî û çend mudurên giştî aîîkariya her yekî ji wan dikin îi gor destûrên wan beşên (departementên) ku OBH datîne.

Madda duwazdan: Berpirsîyariyên OB yên jêrîn in:

a) garantiya bicihkirina qanûn û nîzaman.

b) Bicihanîna biryarên edliyê

c) Bicihanîna belavkirina edeletê. Parastina ewleyî û nîzama giştî, dezgehên netewî yên giştî û herêmî, maîê dewîetê yên giştî û yên taybetî.

196

d) Derxistina biryaran di her maddeke de ku ji bo bicihkirina qanûnên herêmî îazim in.

e) Selahiyeta îcarekirina li ser dezgeh giştî yên herêmî.

f) Ew karmendên îdara otonomiyê yên ku tayînkirina wan re girêdayî fermanek komarî an

muwafeqa serokkomar e, ji aliyê OB tên tayînkirin li gor qanûnên xizmetê û kadroyên ku ew dikevin bin hukmê qanûnên ku li ser tevayiya îcarmendên Komarê dimeşin, bi mercê ku ew karmendên /z' navçên îdarî yên ku piraniya wan Kurd in, ji Kurdan bin, mudurên rêxistin û daîrên navendî ku /z' herêmê ne jî tê de bêyî ku hukmê mada sisiyan a vê qanûnê bê jibîrkirin û bi mercê ku meclîsa karûbar a herêmê têkeve şûna mecîîsa karûbarê giştî.

Heger pêwîst me em dikarin bikevine nav axa îraqê. Ma Amerîka ii îsraîl, dema pêwîst dibînin, diçin di nav dewletên din de operasyonan çêdikin ii tên; lê çima em neçin? Ordiya Tirk serbest e. Her dema ku bixwaze dikare li derê tixiibên xwe operasyonan çêbike...
GerîUayên PKK saet di 9'ê êvarê de êrîşeke mezin bir ser merkeza bajarê Hezexê (IdUê). Bi roketa qerargayên leşkerî ii poUsan gulebaran kirin. Şer di nav gerilla ii ordiya Tirk de 18.30 dom kir. Encama şer hîn ne dîyar e. Ordiya Tirk ji her alî ve derdor li bajêr digire. Elektrîka bajêr hatiye birîn

ii hatin ii çiindin qut biiye.
Li ser revandina 10 turîstên Elman, berpirsiyarê ERNK
Alî Sapan U li Elmanyayê preskonferansek pêk anî ii dîyar
kir ku:
-Ji griibek gerîllayên wan turîstan girtine. Niha turîstên
Elman li gel wan in ii rewşa wan gelek baş e. Ji bo berdana
wan daxwazeke wan ji dewleta Elman tune. Bila dewlet li
herêmê operasyonan rawestîne, em dê turîstan berdin.
Biilent Ecevît prenskonferansek da ku:
-Min berê Jî gotibûn. Weîatên Rojava dixwazin li
bakurê îraqê dewleteke hefsarkêş çêbikin. Divê Tirkiyê ne
bi Kurda re têkilî deyne, tam ziddê wê divê bi îraqê re
têkiliyan geş û xurt bike. îktîdarê weha nekir. Niha hêzên
Rojava dixwazin ji PKK re alîkariyê bikin...
333
Hê jî wezîrên Kariibarên derveyiyên dewletên îslamî li
Stenbolê ne. Operasyona Tirkiyê ya li nav axa Kurdistana
îraqê bala wan jî dikşîne. Li gor rojnamevanan îran operasyonê
di cih de dibîne ii Suriye li dij derdikeve. Hîn
dîtinên wezîrên din ne dîyar e.
rê Tebaxê
Wezîrên Tirkiyê li ser operasyona nav axa Kurdistana
Iraqê civiyan. Piştî civînê Serokwezîr Mesut YUmaz bersiva
rojnamevanan da.
-Piştî şerê Kendavê (Xaîîcê) valahiyeke sîyasî û îeşkeri îi
bakurê Iraqê pêk hat. Terorîstan ji vê yekê fêde dîtin û di
van rojên dawî de îi derdora Hekariyê 9 leşker kuştin. Me
emîr daye komutanê giştiyê Tirkiyê, dê di demeke geîek

kurt de ordî dê pirsê çareser bike. Pêwîst e, ku ewîekarî û parastina Tirkiyê pêk bê.
Li gor agahdariyên meqamên resmî, Tirkiye êdî ji wê herêma ketiye dernakeve. Di her Skm'yî de qereqolek çêdike. Ji vir şiin de dê ordiya Tirk U wir bimîne.
Komutanê giştiyê ordiya Tirk jî daxuyaniyek da ku:
-Ji roja 4'ê Tebaxê ve ordiyê dest bi operasyonan kiriye.
Li gor tespîtên me 5 kampên PKK yên cuda cuda îi bakurê îraqê hene û di wan kampan de qasî 600-700 gerîlla hene. Hedefa me paqijkirina wan e. Balafirê şerê ji bajarên Maîatya, Batman û Dîyarbekirê radibin. Balafirên F-4, F-104 û heîîkopterên modern guîe dibarînin. heta niha 92 sefer kirine. Di operasyonê de 20.000 îeşkerên komando û 1000 caş cih girtine.
PKK bi roketan helîkopterek xistiyê ii li Batmanê jî çend bomba ji balafiran ketine,. Hin yek nizane zerar ii zîyan gelo çi ye.
334
Her kes meraq dike gelo hêzên Çalak ên ku li Batman ii li Silopiyê ne, ew jî mudexeleyê operasyonan dikin an na? Rojava bê deng e. Lê, li gor niiçeyan hêzên welatên Rojava dibêjin ku; " PKK û geîê Kurd ne yek in. Em ji bo parastina gelê Kurd hatine".
PDK-Î daxuyaniyek da ku ordiya Tirk di dema gulebaranê de kampên penaberan dane ber guleyan ii 29 penaber hatine kuştin. Û ne razîbiina xwe dan dîyar kirin.
Celal Talabanî li Romayê, oprerasyona Tirkiyê bi zimanekî dîplomatîk protesto kir.

Alîkarê wezîrê Kariibarê Derveyî yê îraqê Saîd, U Stenbolê got:

-Leşkerê me li jorê paralela 36 hîç nîne. Bi tenê çend poîîsên me hene. Niha ez Ji vê yekê ne agahdar im.

Li gor ajansan di şerê bajarê Hezexê de 70 gerilla beşdar biine. 5 leşker ii 4 gerîlla hatine kuştin ii 2 leşker jî birîndar biine. Lê çiindin ii hatina bajêr hîn jî qedexe ye.

Lê, li gor PKK, ordiya Tirk gelek kesê sivU qetil kirine ii laşên wan ji raya giştî vedişêrin.

'8ê Tebaxê

Serokatiya leşkeriya Tirkiyê di derheqê operasyona de daxuyanî da ku şer dom dike ii gerîllayên PKKê ber bi tixiibên îranê ve direvin.

Berdevika wezaretên Tirkiyê, îmran Aykut; " em herêmê ji PKKê paqij dikin".

Li ser pirsa rojnamevanan ku li herêmê bi tenê PKK tune xelkê sivU jî heye?

îmran Aykut:

-Ew ew kesên ku li herêmê Ji PKKê re aîîkariyê dikin sivîî nayêne hesab kirin. Kî dibe bila bibe em wan jî bombe dikin.

335

Li Stenbolê di konferansa îslamî de, li ser pirsa operas yonên ordiya Tirk gotiibêjan îro jî dom kir. Tirkiyê carek din got ku " em naxwazin îraq perçe bibe" .

Wezîrê derveyî yê Tirkiyê ii yê Suriyê li ser vê pirsê hevdîtinekî taybetî pêk anîn.

Li gor rojnameyên Tirkan hedefên kampên PKKê

satalîtên Amerîkayê li herêmê tespît kirine. Fotografên wan kişandine ii dane ordiya Tirk. Helîkopterên Amerika yên keşîfê her tim di U ser herêmê difirin.
Li Ankarayê Celal Talabanî ii li Zaxoyê jî berpirsîyarê PDK-Iraqê daxuyanî dan ku "eleqetên wan li geî PIGC hîç nîne. Ew Kurdên îraqê ne û îi herêma xwe dawa otonomiyê dikin. Ji ber vê yekê jî ew nahêiin tu terorîst bên û îi nav axa wan bi cih bibin".
'9ê Tebaxê
Elmanyayê noteyeke protestoyî da Tirkiyê ku ketiye nav axa Kurdistana îraqê ii xelkê sivîl bombebaran dike. Di protestoya xwe got ku:
-Tirkiye peymanê Heîsînkiyê îhlaî dike û dikeve nav axa dewîeteke din û însanên sivîi qetiî dike. Em dê vê rewşa êrîşkar a Tirkiyê bînin civîna Konseya Ewropayê Jî. Swêd ii Swîsrê jî bi zimanekî dîplomatîk êrîşa Tirkiyê protesto kirin. Swîsrê ambargoya çekfiroinê li ser Tirkiyê danî.
Turîstên Elman hatin bajarê Stutgardê. Yekê ji wan ji BBC re weha digot:
-Gerîlla Ji me re gelek baş bûn. Bi taybetî ji yên zarok re. Dema bi şev wan cihên xwe diguhart, zarokan dikirin pişta xwe û dibirin. Pirsa Kurdan gelek girîng e. Bi rastî

em nizanibûn îi ser Kurdan hewqas ziîm û zordarî heye. Ez bawer im ku Kurd dê bigihên mafê xwe...
lO'ê Tebaxê
Operasyona ordiya Tirk U Kurdistana îraqê dom dike.

Tirkiye di her 5 km'yî de dest bi çêkU-na qereqoleke dikm.
Li gor ajans ii rojnameyan Tû-kiyê êdî zii bi zii ji axa Kurdistana îraqê dernakeve. Wezîrê Kariibarê Derveyî yê
TU-kiyê Sefa Giray dibêje ku:
-Heta herêm Ji terorîstan neyê paqijkirin em ordiya xwe Ji wir ji paş ve nakşînin. Divê em pirsê di carekî de çareser bikin.
ll'ê Tebaxê
Ordiya Tirk U Kurdistana îraqê operasyonan didomîne.
Di derheqê operasyonan de agahdarî nade ii sansur U ser çapenemiyê heye.
Balafirên Koma Neteweyan dê di ser îraqê de bifirin ii ji hewa de xebatên leşkerî ii çekên îraqê kontrol bikin. Balafirgeh li Suudî ne. Dê ji wir balafir rabin ii li ser îraqê bifirin û keşîf bikin. Di vî warî de çar heUkopterên Alman jî dê bi kar bînin.
'12ê Tebaxê
Operasyon dom dike. Wezû-ê Ewlekariyê Tirkiyê Dogu Barlas di derheqê operasyonan de agahdarî da:
-Heta niha leşkere û caşekê me hatine kuştin û ji PKKê jî 35 kes hatine kuştin. Heta ku dawiya "terorîstan" neyê dê operasyon dom bike.
337
'13ê Tebaxê
Operasyona Tirkan hîn jî li Kurdistana Başiir dom dike.
Ordiya Tirkiyê xwe bi ber tixiibê îranê ve dimeşe. Şer di nav gerillayên PKK ii Ordiya Tirk de car caran germ dibe.
Tê gotin ku PKK ji kampên xwe yên îranê destek distîne.

3rojnamevanên Tirk kampa PKK U li Kurdistana îraqê zîyaret kirin. Ji wan yek jî niiçegîhanê rojnameya Hurri yetê, Farûk Balikçi bû. BBC bi Faruk Balikçi re bi telefonê hevpeyvînek çêkir. Fariik Balikçi:

-Kampa PKK nêzî tixûbê îranê di çiyayekî asê de bû. Berpirsîyarê kampê Osman Öcalan me qebûl kir. Di kampê de qasî 100 kesî gerîlla hebûn. Ew 7 leşkerên ku li Şemdînliyê dîl girtibûn bi me şan dan. Li gor gotinên wan di şer de heta niha 4 gerîlla hatine kuştin û 6 birîndar dane. Digotin ku şer de ordiya Tirk wenda kir û dê bike. Geîê Kurdistana îraqê bi me re ye. Herêma tampon ordiya Tirk xilas nake.

Li Qurtelanê ji bo pîrozkirina 15ê Tebaxê bi hezaran kes xwestin meş ii mitîngek pêk bînin. Şer di nav xelkê ii leşker ii poUsên Tirk de derket ii sivUek hat kuştin. Berpirsîyarê PDK-îraqê U Dîyarbekirê daxuyaniyek da ii got:

-Em îzin nadin ku PKK li Kurdistana îraqê bi cih bibe. Tirkiye divê ji me re alîkariyê bike û ji her alî ve welatê me ava bike.

Koma Neteweyan biryar girt ku ew kesên ku di şerê Kendavê de zerar dîtine, dê Koma Neteweyan ji wan re qasî 250 dolarî alîkariyê bike. Ji vê yekê hemwelatiyên Iraqê dê fêde nabînin. Herweha dewletên ku zerar dîtine li derê vê biryarê dimînin, bi tenê dê ji şexsan re alîkarî bêkirin.

338

Koma Neteweyan rapor da ku îraqê gelek çek ii malzemeyên

şer veşartîye. Ji wan yek jî topên diir menzîl in. 50 metre liileyên wan dirêj ii 35 cm jî dirêj in. Dê Koma Neteweyan di demeke kurt de wan topan bişkîne.

'14ê Tebaxê

Ordiya TU-k dema êrîşê Kurdistana îraqê kir, digot:

-Me kampên PKK bi fotografan tespît kirîye û em li hedefa xwe dixin û xeîkên sivîî hîç zerar nabîne. Lê li gor raporên Koma Neteweyan ordiya Tirk kamp û gundan bombebaran kirîye û heta niha 9 kesên sivîl hatine kuştin. Lê, îi gor agahdariya çavkaniyên serbixwe hejmara sivîîên mirî ne 9 kes in, gelek in.

Berpirsîyarê PDK îraqê Dîzaî îro li Dîyarbekirê daxuy'iani yekê da ii got ku:

-Li Kurdistana îraqê PKK tune. Heger hebin an jî werin li wir bi cih bibin, dê pêşmêrgeyê me li wan bidin û ji wir der bixin.

Berpirsîyarê PKKê yê Ewropa li ser encama şer rawesta ûgot:

-Heta niha 300 leşkerên Tirk hatine kuştin û ji me Jî 4 gerîlla şehîd ketine.

PKK ji bo salvegera 15'ê Tebaxê hazirîya çalakî ii êrişan dike. Dewlet jî tedbîrên mezin li hember êrîşan girtîye. Lê, dîsan şeva dinê PKK avêt ser Şemdînan ii şer di nav wan ii leşkerên Tirk de derket.

Walîyê kolonîyalîst Kozakçioglu civîna xwe ya dawî li Dîyarbekirê kir. Ji ber ku tayîna Kozakçioglu çendekê berê

339

derketibii ii ew bii waUyê Stanbolê. Kozakçioglu bilançoya

5salan da:
"Li ser navê daweya PKK heta niha 1353 kes hatin girtin. 471 leşker û poîîs Ji aliyê PKKê ve hatin kuştin. Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê îro li dij operasyon û êrîşên ordiya Tirk meş û mitîngeke pêk anî. Li meydana Sergel qasî 300 kesî civîyan û ordiya Tirk a dagîrker protesto kirin. Serokê Federasyonê axaftinekê kir û di axaftina xwe de ordiya dagîrker protesto kir û ji Swêdê jî daxwaz kir û bi şêwekî tûj û xurt Tirkiyê protesto bike. Meşê dest pê kir û meşê heta ber konsoîosxana Tirkiyê dom kir. Li wir nameya protestoyê hat xwendin û nameyê dan konsoîosxana Tirk".
340
'15ê Tebaxê
Li gor agahdariya berpirsîyarê Bereyê Kurdistanê Burhan Salîh, îraqê 5 tuxay şand ser bajarê Hewlêr ii Silêmaniyê heUkopterên îraqê U nav paralela 36 -an de difirin. îraq dixwaze tesîrê li ser Kurdan zêde dike ii Kurd li Bexdayê dev ji hinek daxwazên xwe berdin. Salih dixwaze ku Koma Neteweyan ii dewletên Rojava li ser îraqê tesîr bikin ii Kurdan biparêzin. Berpirsîyarê Bere dixwaze Welatên Rojava ii Koma Neteweyan îzin nedin êrîşên îraqê ii pêş li koçebarên nii bigre.
Li gor niiçegîhanê rojnameya Milliyetê Rifat Balli, Partiya Azadiya Kurdistanê U bajarê Dihokê U dij êrîşa ordiya Tirkiyê meş ii mitîngekê pêk anî. Di meş ii mitîngê de qasî 3000 kesî beşdar biin. Berpirsîyarê Partiya Demokrat birarzê Mesiid Barzanî xwest meş ii mitîngê bide rawestandin

lê nikaribii pêş lê bigire.
Li gor şirove ii dîtina Rifat Balli, li Kurdistana îraqê ji PKKê re sempatiyeke gelek mezin heye ii PKKê prestîjeje mezin di nav gel de girt. Pêşmergeyên PDK -îraqê Yekîtiya Nîştîman ji PKKê re alîkariyê dikin.
Li Kurdistana Tirkiyê ji bo avakirina 7 saliya Artêşa PKKê, li gelek cihan çalald pêk hatin ii biiyer derketin. Li ser banga PKK, dukandar dukanê xwe girtin. Li Batman, Silîvan, îdil, Lîce, Hêne, Hezro, Bismil, Nisêbîn, Cizîre ii gelek cihên din esnafan deriyê dukanên xwe girtin. Li gor ajansan li Nisêbîne riyên bajêr ji her aliyî ve hatine girtin ii li bajêr teqînên çekan tê.
PKKê riya Bedlîs ii Dîyarbekirê 5 saet girtin ii aUkariya ku ji leşkerên Tirk re hat ew ketin dafika PKKê. Serokleşkerek ii 4 leşker hatin kuştin.
Serokê leşkeriyê giştiyê Tirkiyê rojnamevanan bir herêma operasyonên Kurdistana îraqê ii got:
-Me zerareke mezin da PKKê. Kampên wan belav kir.
341
Rojnamevanan xwe negirt ii ji general birsîn:
-Generalên birêz, ka ne laş ii ne jî cihên kampên wan li holê tune ne?
General weha digot:
-Ya girîng ne hejmara kuştiyên PKK ye û nîşandana cihên kampên wêrankirî ye. Ya girîng ew e, ku belavkirina hêzên wan e. Me wan Ji herêmê derxist. Em gehîştin armanca xwe.
îşev Koma Neteweyan dê biryar bigire, ku îraq ji bo

alîkariya mirovî petrola xwe bifroşe. Heger biryareke pozîtîv bê girtin dê xeta petrola Tirkiyê vebibe ii di ser Tirkiyê de petrola îraqê bê firotin.
Celal Talabanî methê doktorên Tirk da. Talabanî li TU-kiyê tedawiya dil bii ii di derheqê doktor ii tenduristiya Tirkiyê de ji rojnamevanan re got ku:
-Doktorên Tirk geîek zîrek in. Wek hûn dizanin ez çendekê berê li Londonê bûm. Ez /i wir jî çûm ser doktor. Wan xwest ez demeke li wir bimînim û tedawî bibim. Lê min nexwest û min doktorên Tirk tercîh kir. Bi rastî doktorên Tirk di warê tibî de Ji yên Ewrop kêmtir nîn in...
'16ê Tebaxê
Koma Neteweyan biryara firotina petrola Petrola îraqê girt ku îraq dikare 10 milyar kron petrol bifroşe. Ev firotin di bin kontrola Koma Neteweyan de ii bi vî pereyî ji xelkê îraqê re îhtîyaciyên xwarin ii derman bên kirin. Para ku ji ber bimîne jî, dê wek tazmînat bidin ew dewletên ku di şerê Xalîcê de zerar dîtibiin. Berpirsîyarê îraqê yê li Koma Neteweyan , EI Ambarî bi tiindî li dij vê biryargitina Koma Neteweyan derket ii biryarê protesto kir.
îraq bi hêzên xwe yên Komarî der ii dor U bajarên
342
Kerkiik, Hewlêr ii Silêmaniyê girtîye. Leşkerên îraqê mêran digrin ii dibin ii kal ii pîr ii jin ii zarokan jî ji bajêr dertînin der ii surgunê bajarên din dikin. Ji xwe şeva çiiyî berpirsîyarê çiiyî dixwest ku hêzên Çalak mudexelea ordiya îraqê bikin. Berdevikê Qesra Spî jî rastiya biiyerê qebiil kir ii got ; " ordiya îraqê di hareketê de ye" .

Li Bexdayê Mesiid Barzanî, Wezîrê Ewlekariyê îraqê, Alî Hasan Mecît zîyaret kir. Wek tê zanîn Alî Hasan Mecît di nav Kurdan de, bi navê qesabê Helebçê tê nas kirin. Vê zîyareta han bala çapemeniya cîhanê kişand ku îraq dixwaze li gor daxwaz ii pêşnîyariyên xwe peymanê bi Barzanî ii heyeta pê re bide îmza kirin.
Celal Talabanî, berî ku here Kurdistana Başiir, li Dîyarbekirê li ser pirsên rojnamevanan.
-Bila ordiya Tirk ji bakurê îraqê derkeve. Em dê bi pêşmêrgeyên xwe herêmê kontrol bikin. Wê demê em nahêlin PKK bê herêmê û li wir bi cih bibe. Heger bê em dê lê bidin. Bila herin li welatê xwe şer bikin.
Tirkiyê, bi zimanekî tiij Swîsrê protesto kir ku wê biryara ambargoya danîna çek li ser Tirkiyê gU-tibii.
irê Tebaxê
Serokwezîrê Tirkiyê Mesut Yilmaz, bi zimakekî tehdîtkar bala Celal Talabanî ii Mesiid Barzanî kişand.
-Celal Taiabanî û Mesûd Barzanî dê îi herêma ewlekariyê pêk bînin û nehêlin PKK li wir bi cih bibe. Heger ew nekin û nikaribin bila ji me Jî loman nekin. Wê demê em dikarin û dizanin li wan deran çi dikin. Wê demê jî dê ew zerarê bibînin. Em naxwazin bikevin nav axa îraqê û ji îraqê ax bistînin. Em ji seri de yekîtiya axa Iraqê diparêzin.
343
IngUiztanê ketina ordiya Tirk li îraqê ne di cih de dît. Daxuyaniyekê da ku ordiya Tirk ji Kurdistana îraqê derkeve. Wek tê bîranîn çend roj berê Elmanya, Swêd ii Swîsrê jî derketina ordiya Tirk daxwaz kiribiin.

Apo presskonferansek çêkir ii di presskonferansa xwe de got ku:

-Divê ji îro şûn ve turist bê îzna me neçine Kurdistanê. Yên ku bixwazin herin Kurdistanê divê Ji me îznê bigrin. An jî em berpirsîyariya wan nagirin ser xwe.

Niiçegîhanê rojnama Hurriyetê Rifat Balli li Kurdistana îraqê kampa PKK zîyaret kir. Li gor R. Balh kamp li Kurdistana îraqê ye ii gelek nêzî sînorê Tirkiyê ye. R. Balli, bi berpirsîyarê kampê CemU BayUc re hevpeyvînekê çêkir. C. BayUc:

-Me tixûbên navbera Kurdistanê êdî rakir. Kurdên Kurdistana îraqê êdî bi me re ne. Hêzên Kurdistana îraqê êdî nikarin xelkê li dij me bi kar bînin. Kampên me ji derê îraqê li Suriyê û îi îranê jî hene. Lê, me van kampana li dij Tirkiyê bikar ne aniye.

Rojnamevanê Tirk Rifat Balh, li gor dîtin ii lêkolînên xwe dibêje ku " di nav Kurdê îraqê de Prestîja Apo û PKK gelek zêde bûye".

'18ê Tebaxê

Li gor rojnameya îraqê ji bo îmzakirina peymanê du pêşname amade ne. Dê di van rojan de Hukimeta îraqê ii heyeta Kurdan wan îmza bikin. Lê, serokê Kurdan ên ku li Bexdayê ne, di vî warî de bê deng in. Guman heye, ku Kurd ii hukimeta Bexdayê li ser mercên peymanê U

hevdu nakin ii Bexda dixwaze bi zorê mercên xwe bi wan bide îmza kirin.

Wezîrê Plan ii Avayî yê îraqê îro daxuyanîyek da

çapemeniyê.

-Piştî rawestanina şerê Kendavê heta îro îraqê ji ber ambargoya abori 17 milyar doîar zerar dîtîye. Weîat wêran e. Proje pêk nehatin. Fabrîqe naxebitin. Gel birçî û perîşan Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal bi zimanekî nerm çapemeniya Tirk tehdît kir, ku li ser PKKê carek din nenivîsin.

-Hûn bi nivîsarên xwe propaganda PKKê dikin. Divê hûn weha bê ser û ber nenivîsin. Heger pêwîst be jî, wek nûçeyên biçûk li rûpelên dawî yên rojnameyan binivîsin. Wek me berê jî nivisîbii Waliyê Kolonîyalîst Hayri Kozakçioglu tayîna wî derketibii ii bûbû waliyê bajarê Stenbolê ii di şiina wî de waUyê bajarê Konyayê Çetinkaya hatibii tayîn kirin. Lê, Çetinkaya heta îro neçiibii Dîyarbekirê ii dest bi wezîfê xwe nekiribii. Di rojnameyan de niiçeyek belav bii ku Çetînkaya naxwaze bibe waliyê Dîyarbekirê ii ew dixwaze bibe berendamê parlementoyê. Li ser van niiçeyê îro Çetînkaya bi lez û bez firî ii çii Dîyarbekirê ii dest bi wezîfeyê xwe kir. Lê, dîsan li gor niiçe ii şiroveyên rojname ii rojnamevanan Çetînkaya dê di demeke kurt de ji waUtiyê îstîfa bike ii bibe berendamê parlementoyê.

345

'19ê Tebaxê

Li dij Gorbaçov darbeyek çêbii

îşev li Sovyetê li dij Gorbaçov derbeyek çêbii. Gorbaçov li Krimê hat girtin. Alîkarê Gorbaçov bii serokê derbeyê ii gotin ev qaniiniye, ji ber ku Gorbaçov nexweş e ii li gor

qaniina bingehîna Sovyetê aUkarê wî dibe serokê Sovyetê.
Derbevan 8 kes in.
Derbevan gelek nerm in. Dibêjin ku li welatê me otorîte
ii dîsîplîn nema ye. Em ji bo pêkanîna ser ii ber hatine. Lê
em polîtîka ii riya glasnost ii prestroykayê dimeşînin. Ew
peymanên navnetewiyên ku di dema Gorbaçov de hatine
îmza kirin, em hemiiyan qebiil dikin...
Boris Yeltsin ne hatiye girtin ii wî li dij cuntayê banga
têkoşînê kir. Li Moskovayê bi hezaran kes derketin der ii
li her derê bajêr dest bi çêkirina bariqatan kirin. Li bajarê
Lenîngradê ii li komarên Baltîk xelkê dest bi protestoya kir
ii meclîs, xaniyên TV ii radyoya bi laşên xwe diparêzin.
Leşkerên cuntayê bi sedan tanq ii top ve hem U Moskova
ii hem jî Baltik ber bi merkezên bajaran ve dimeşin.
Yeltsin li Moskovayê derket ser tanqeyek ji xelkê re
hîtab kir ku têbikoşin. Ji aliyê din ve Yeltsin bi Serokê
Amerîka Bush, Elmanya Kohl, îngilistan J. Major re bi telefonê
peyîvî ii ji wan alîkariyê xwest. Serokên van
dewletên Ewropa hîn tam qerara xwe nedane ii bi balkêşî
li pêşveçiina biiyeran ii poUtîka derbevanan dinêrin.
'20ê Tebaxê
Li Sovyetê rewşa tevlîhevî dom dUce. Xelk bi Yeltsîn re
bi şev bi roj U kolanan ii di ber xwe didin. Êrîşên ser
tanqan dikin. barîqatan xurt dikin. Cunta nikare bi pêş ve
gav bavêje. her ku diçe hejmara yên li hember zêde dibe.
Panîk di nav derbevanan de dîyar dike. Ji Gorbaçov agahdarî
nîne. Dewletên Rojava li dij cuntayê tewrê xwe

diguhêrin. Bush ii serokên din dibêjin ku divê Gorbaçov vegere ser wezîfeyê xwe ii Yeltsin jî Bush zêde bi ser derbevanan ve here ii bi telefonê bi Gorbaçov re bipeyîve.
NATOyê acizbiina xwe dîyar kir û. biryara civîneke awerte giri.
Saddam, ji serokên Rêxistina Filîstîniyan a herî Bilind Yasîr Abdurrebo, Kadafî ii Sudanê re piştgiriya xwe dîyar kirin.
'21ê Tebaxê
TV KanaI-4 ya îngiliztanê U ser operasyonên ordiya Tirk programek çêkir ii di programa xwe de di got ku " Tirkiyê îraqê dagîr kir. Amerîka, Koma Neteweyan û welatên Ereb vê yekê nabînin an Jî naxawazin bibînin"...
Li ser operasyonên Tirkiyê,Wezîrê Kariibarê Derveyî yê Misirê gazî maslahatguzarê Tirkiyê yê Kahîrê kir ii bala wî kişand. Rojnameyên Misirê jî nivîsandin "Çavên Tirkiyê û îsrail di axa Ereban de ye" .
Derbevan ii leşkerên wan nikarin tiştekî bikin ii barîqatan bişkînin. Ji KGB ii Ordiyê gelek serleşker ii leşker diçin aliyê xelkê. Hem jî bi tanq ii topan ve. Panîk di nav derbevanan de zêde dibe hinek ji wan îstîfa kirin. Xelk daveje ser tanqên wan û leşkeran bi destan ji nav tanqan dertînin der. Heta niha ji herdu aliyan 13 kes hatine kuştin. Bush ii serokên rojava xwe li dij cuntayê gij ii tiij dikin ii cunta her ku dice bi paşve gav davêje.
347
Muzîka xelkê û strana me!
"Heger demokrasiya ku tro li Tirkiyê heye, li îraqê hebûna,

me qet têkoşîn ji bo otonomiyê ne didan.
Divê Kurdên Tirkiyê bi pêwendî, rê û metodên aştî pirsa xwe çareser bikin.
Me ne dixwest hêzên hevkar bikevin nav axa îraqê; îê, geîê me xwest. Em rûmeta dîtina gelê xwe digirin".
Ev peyvên jorîn, ne ji bal siyasetvanek Tirk an Ereb hatine gotin. Ew peyv ên siyasetvanek Kurd ê binav, ji başiirê Kurdistanê, serokê Yekîtiya Niştiman a Kurdistanê Celal Talabanî ne. Ez naxwazim bi kiirayî tii şirove li ser van peyvên jorîn çêkim. Her weha qet daxwaza min a ketina polemîkan tune ye. Bi taybetî di vê dema, ku Kurd divê bi yekdengî derkevin şanoya siyasî ya navnetewî. Lê realîte ii rastiya Kurdistanê, di vê prosesa gelek girîng ji welatê me re, mixabin nikarin mirov bêdeng ii bê ra bihêlin. Nîşandana prensîbên welatperwerî ii berjewendiyên netewî, dîplomatî ii xwedî riimetbiin, xuya ye dibe barek li ser milên rojnamevaniya Kurd, a ku divê bi vê erka xwe rabe. Gotina rastiyê, çend tehl jî be, divê derkeve ronahiyê. Ev rexneya tê kirin, ji bo avakirinê, ji bo armanc ii têkoşîna netewê Kurd di beşê Bakiir de, paşçav neyê girtin.
Gava C. Talabanî çii Bexdayê piştî trajediya Kurd li başiirê Kurdistanê ii cih girtina pirsa Kurd di rojeva siyasî ya dinyayê de - maçên bi Saddam re ne tenê em Kurd, lê tevayi ya dinyayê şaş kirin. Ne me Kurdan, lê bîyaniyan dipirsî - tiştekî wusa çawa

çêdibe ? Dilsariyek wusa gelo mumkun e. Piştî, bi
348
hezarên zarokên Kurd bi şehîdbiina xwe ji êrîşên
Saddam, ji birçîbiinê, ji sermayê, ji hêzketinê, li ser
çiyan canên xwe yên meliil wundakirin. Vê trajediyê
raya giştî ya hemii cîhanê nêzî Kurdan kir. Çawa, serokek
Kurd bi germî qatUê wan - Saddam, çend caran
himêz ii maç dikir ? Hişê biyaniyan ev tişt ne
dikşand. Dipirsîn, lê Kurd jî nikarîbiin bersiva wan
bidin.
Mixabin, şanoya bê mantiqî ku li Bexdayê hate
leyistin, bi vê jî neqediya. Piştî çend saetan bi
Saddam re hevdîtin ii axaftin, C. Talabanî U ber roj-
namevanên dinyayê digot : "Baweriya me bi hukimeta
me ya navendî (ya Bexdayê) tê. Ew çi bibêja
divê em gelek girîng bigrin. Ji ber ku daxwaza me
jîyana bi hev re ye. Gava armanca me ev e, divê em
guhdariya navendiyê bikin. Hemii hemwelatiyên
me, yên dev ji mal ii cihên xwe berdane dikarin vegerin
malên xwe. Em ê Iraq a demokrat ii yekgirtî bi
hevdu re ava bikin. Heta çend rojan wê statiiya Kurdistan
a otonom jî dîyar bibe. Li ser her tiştî me li
hev kiriye".
Roj derbas biin, meh derbasbûn...Hîn jî ne
statiiya Kurdistanê hate diyarkirin, ne jî îmzayên
otonomiyê hatine avêtin. Ev ji du - sê mehan
zêdetir e, ku serokê Eniya Kurdistan ii yê Partiya Demokrat
a Kurdistana Iraqê Mesûd Barzanî li Bexda

ye, lê pêwendiyan hîn jî encamên dawî na nîne.
Ev çend meh in, ku li Kurdistanê biiyerên mezin
yên dîrokî pêk tên. Roj tune ye U welêt ji bakiir heta
başiir serîhildan, berxwedan an xwepêşandan ên
fereh neqewimin. Bi taybetî, piştî trajediya li başiirê
Kurdistanê, li bakurê Kurdistanê têkoşîna mirovê
Kurd gihişt merhelek bilind. Di vê demê bi xwe de
hatina C. Talabanî ya Tirkiyê, li gel xwe şiroveyên
349
gelek cuda anîn xolê. Dîsa jî em dikarin bibêjin, ku
daxuyaniyên wî nebane U vê biiyerê ji bal Kurdan ve
normal bihatan dîtin. Xelkê digot, rewşa başiirê Kurdistan
ii hatina bi sedhezaran mirov nav "sînorên"
Tirkiyê, ew mecbiir kirine da werê Ankarê. Tii kesî
ne dixwest spekulasyonan li derdora ziyareta Talabanî
li Enqerayê ii hevdîtinên wî bi niinerên dewleta
Tirk re, bike. Lê, daxuyaniyên Mam Celal, Kurdên
bakurê Kurdistanê şaş dikirin. Wî bi "şîretên
dîplon^atî " bala xwe dida zê deyî 15 - mUyon Kurdên
bakurê Kurdistanê.
"Eger demokrasiya ku li Tirkiyê heyî, li Iraqê
hebane me qet têkoşîn ji bo otonomiyê li Iraqê ne
dida" .
Way li minê... Demokrasî ii Tirkiye ii rewşa 15-
milyon Kurd... Mirov nizane çawa, van peyvan di
cumleyekê de li hev bîne. Lê Talabanî, wan bi rêzek
wusa îdeal bireng dike, ku xelkê bêjê, bavo ma ev
Kurdên Tirkiyê çi dixwazin (!) Her wusa Talabanî,

piştî hevdîtina xwe bi Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal re kir, nizanibii bi çi peyvên xweşiktir pesnê wî bide. Sed xwezî jê re, ku bîyaniyan bi xwe baweriya xwe bi peyvên "serokê " Kurdan ne danî. Rastî jî wusa bii. Ji ber rewşa bakiirê Kurdistanê U ber çavan bii. Xelkê digot: "Eger demokrasiya" li hemberê Kurdan a Tirkiyê numune be, way li halê dinyayê...
Piştî van gotinên Mam Celal çend roj derbas nebiin ku dewleta Tirk teroreke dijwar U bakurê Kurdistanê pêk anî. Gelek welatperwerên Kurd ji malên xwe hatin girtin. Piştî demekê li devereke dervî bajaran, kuştî hatin dîtin. Kovarên Kurdan
350
hatin bombekirin. "Demokrasiya" Tirkiyê, dest pê dUcir dîsa riiyê xwe nîşan bide.
Hefteyek, du piştî hatina C. Talabanî ya yekem li Tirkiyê derbas nebii, vê carê li Istanbolê Konferansa EnternasyonaUya Sosyalîst çêbii. Navê Mam Celal dîsa di nav mêvanên, vê civînê de bii. Û ew carek din hat Tirkiyê. Lê ne êşkenceyên ku li şoreşgerên Kurd têne kirin, ne terora fereh a dewleta Tirk li bakiirê Kurdistanê, ne înkara hebiinê ku peşberê netewê Kurd li Tirkiyê tê kirin, ii ne bi sedên din... pirsgirekên pirsa Kurd a bakiirê Kurdistanê hatin bîra Talabanî. Wî dîsa daxuyaniyên xwe yên "dîplomatî " da danezanên ragihandinê.
"Divê Kurdên Tirkiyê bi rêyên aştiyê û pêwendiyan pirsên xwe çareser bikin".

Çawa ? Li ser çi bingehî ? Li ser van tiştan tii tişt
ne got Talabanî. Her wekî ku wî nizanîbii - sedema
ne aştiyê U Kurdistanê, dewleta Tirk bi xwe ye. Her
wekî wî nizanîbii, welatê Kurdan ji bal wê dewletê
ve hatiye dagîrkirin. Her wekî wî nizanîbii, şoreşger
ii mirovê Kurd di nav "sînorên" vê dewletê de, gava
dibêjin - em mafên xwe yên netewî dixwazin, tên
girtin, tên talankirin, tên êşkence kirin, tên kuştin...
Sed mixabin, ji cihê ev peyv, ji kesekî ne agahdar re
U ser pirsa Kurd bên gotin, muhatabê wan dibê siyasetvanek
Kurd ê binav. Yekî, ku gelekan ji me heta
îro bi hêvî, bi hêviyek ku wê pêngavên wî, berjewendiyê
ji netewê me re bêne, hatiye meyzandin...
Kirinên Celal Talabanî, bi van tiştên jorîn jî ne
qediyan. Di 25 ê Tirmehê de, ew careke din derbasî
Tirkiyê dibii. Vê carê dîtina wî bi waUyê idara orfî yê
351
Kurdistanê, Hayrî Kozakçioglu re bii. Ez bawer im,
ne pêwîst e, ku em H. Kozakçioglu li vir bidin nasandinê.
Her Kurdekî ji bakiirê Kurdistanê, kirinên
wî li welatên xwe baş dizane. Ne tenê jî Kurd. Her
wusa bîyanî yên ku bi pirsa Kurd ve mijiil dibin, vî
kesî baş nas dikin. Di çiina xwe ya Tirkiyê de, parlamenterek
a Swedî ya ku bi Kozakçioglu re hevdu
dîtibii, ne xwestibii destê wî ji bo silavê bigre. Gava
ew parlamenter vegeriyabii Swêdê, bersivên wê di
rojnama " Kurdistan Press " de cî girtin. Wê, li ser
dîtina xwe, bi waliyê idara orfî yê Kurdistanê re weha

digot:
"Gava wî destê xwe Ji bo slavê da min, min destê wî negirt. Min nikarîbû silavê bidim van destên bi xwîn".
Celal Talabanî piştî hevdîtina xwe bi H. Kozakçioglu re tii daxuyanî ne dan danezanên ragihandinê, gelo ew li ser çi pirsan bi hevdu re qisa kirine. Bi " tesadufek " mezin di wê rojê de serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal jî çiibii Diyarbekirê. Di civîna xwe ya bi qeymeqam ii muhtarên heremê re, Turgut Özal ev peyv bikar tanîn.
"Divê kes bawer neke, wê ev welat (qezda wî Tirkiye ye) bê parçe kirin. Eger baweriya hinekan wusa hebe, divê vê baweriyê Ji serên xwe bavêjin. Em ê tehamula wan nekin. Yan wê wekî pewiste runin, an di her cihî de, li vir, îi nav welat (Tirkiye(an li derve Jî bin em ê serên wan bipeîixînin.
Wek tê zanîn di wan rojan de, welatperwer ii şoreşgerê binav, niinerê Partiya Ked a Geleri yê Diy-

arbekirê Wedat Aydin bi xwînxwarî, bi destên dezge hên tarî yên dewleta Tirk ve hatibii şehîd kirin. Di xwepêşandana gorkirin a Wedat de, bi hezarên beşdaran hatibiin gulebarandin. Bi dehan kes şehîd ketin ii bi sedan kes birîndarbiin. Diyarbekir dîsa bii bii navendiya berxwedanê...Ji ber vê serokkomarê Tirkan dixwest çavên Kurdan bitirsîne. Di vê demê de jî, C. Talabanî dihat Tirkiyê. Lê, wî gava bi sedhezarên

Kurd li beşê herî mezin ê welatê wî rabiibiin
ser piyan. Ji bo riimetê, ji bo mafên xwe, ji bo şehîdên
xwe, li ser " axa " Tirkiyê, peyvek li ser
têkoşîna Kird ne danî zimên. Dîplomasî ne ev e-
Mam Celal. Dîplomasî berî her tiştî bala xwe dan ji
bo berjewendiyên netewa mirov bi xwe ye. Heta îro
kes bi pesindana dijminê xwe dîplomasî ne kiriye. Ji
ber ku ew ne dîplomasî ye. Her wusa pêwist e, tu
carî neye jibîrkirin. Riimet dan a têkoşîn ii dîroka
xwe, riimeta mirov bi xwe li ba dost ii dijminan
bilind dike. Pesindana dijmin, mirov dixe. Ne
dijmin baweriyê bi vê pesindanê dike ii ne netewê
mirov ji yekî dilxweş dibe.
Bakurê Kurdistanê li ser pirsa parastina berjewendiyên
netewî gelek hesas e. Rêxistinên Kurd bi
xwe li ser vê babetê, bi awakî girêdayî bi gelê xwe re U
bakiirê Kurdistanê pirsa sexwebiina netewî ji xwe re
kirine armanc. Mîna serokê rêxistinek mezin Mam
Celal, tu vî tiştî pir baş dizanî. Eger U ser vê pirsê kes
ji wan hewceyê şîretê bana, berî her tiştî wî bi teva
yiya netewê Kurd re bikevin pêwendiyê ji bo guherandina
armanca xwe. Ne bi şîretên, ku tu ji bo demokrasiyê
li Tirkiyê, riyên pêwendiyê ii aştiyê didî,
dê xwe biguherînin. Bi rastî jî, rê ne riya ku tu li ser
qisa dikî ii nîşan didî ye. Bawerî ji gelê xwe girtin ii U
ser navê wî axaftin, berpirsîyariyek mezin e. Mirov
353
gava bi vê berpirsîyariya xwe, li gora daxwaz ii

armancên netewê xwe birêve neçe, rê ji hev vediqetin.
Her wusa miorv nabe her roj li ser babetekê tiştên
cuda bibêje. Xwedî prensîpbiin, siyasetvanan bilind
dike. Prensîpê herî mezin jî wekî çend caran hate
nivîsandin, li gel daxwaz, armanc ii berjewendiyên
netewî cih girtine. Di vê rê de xebat, di vê rê de siyaset
ii di vê rê de dîplomasî ye...
Cemal Batun
'22ê Tebaxê
Derbevanên Sovyetê bi ser neketin ii revîn. Gorbaçov
hate Moskovayê. Presskonferansek çêkir ii di presskonjferansa
xwe de derbevanan protesto kir ii Boris Yeltsin ii
Rusan re spas kir.
Ji ber ku derbevanên Sovyetê bi semeketin ii Gorbaçov
bi paş ve hat, NATO civîna xwe ya awerte îptal kir.
'23ê Tebax
Boris Yeltsin bi qeraranameyek li tevayiya Rusyayê
xebatên partiya komunîst qedexe kir. Kilît li deriyên
partiyê xistin ii dest dan ser xanî ii malê partiyê. Li seranserê
Rusyayê rojnameya Pravda jî qedexe kir. Hevalê Yeltsin
bii serokê KGB. Gelek kesan ji partiya komunîst îstifa
kir. Li komarên din yên Sovyetê jî gelek serok ii berpirsiyarên
partiyên komunîst ji partiyên xwe îstîfa kirin. Li peytextê
Letonyayê, li bajarê Talînê bi xwepşandaneke bi sed
hezaran peykera Lenîn ji meydanê daxistin ii kirin nav
354
tabiitekê. Li seranserê Sovyetê jîyana komunîstan kete
tehlîkeyê. Gorbaçov hukimeteke nii ava kir ii mirovên

Yeltsin kir wezîr.
'25ê Tebaxê
Celal Talabanî daxuyaniyek da ajansa Reuter ku guftiigoyên di navbera Bere ii rejîma îraqê de heye baş naçe. îraq dixwaze bajarê Kerkiikê derî herêma otonomiyê bihêle ii garantiya Ewropî ii Koma Neteweyan qebiil nake. Heger ji bo Kerkiikê Kurd dest bi şer bikin divê hêzên Çalak aUkarî ii piştgiriya Kurdan bikm.
Ji aliyê din ve Mesiid Barzanî dixwaze mercên îraqê qebiil bUce ii peymanê ûnza bike, lê Talabanî ji vê yekê re ne terefdar e. Kurd di nav xwe de li ser vê pirsê gotiibêj dikin ii dixwazin bigehên yek biryarek.
'28ê Tebaxê
Celal Talabanî daxuyaniyek da ajansa Reuter ku PKKê bi dizî bi rejîma Bexdayê re têkilî daniye ii ji îraqê aUkariya leşkerî, çek ii herwekî din digre. Û piştre Celal Talabî dom kU:-
-Rêxistinên me tû carê derbasî aliyê sînorê din nebûne bû li wir çalakiyan pêk neanîne. Lê PKK mudaxeîeyê aliyê me Jî dike.
Li gor niiçeyên BBC şeva dinê gerUlayên PKK avêtin ser merkeza bajarê Sêrtê ii lojmanên dewletê dan ber roketan. Li Eriix û Mîdyatê jî avêtin ser qereqol ii lojmanên memiiran.
Berpu-sîyarê ERNK yê Ewropa presskonferensek çêkir ii di presskonferansa xwe de got ku:
355
-Encama operasyonên dewîeta Tirk fîyasko ye. Me ji wê

rojê heta niha, li serhevdu 68 çalakî yên cuda pêk anîne. Çaîakiyên me dom dikin.

'29ê Tebaxê

Kurdan carek din daxwazên îraqê qebiil nekir. Li gor radyoya Wasîngtonê beşê erebî, Mesiid Barzanî çendek berê ji Bexdayê vegeriya bii bajarê Şaqlawayê ii li wir li ser guftiigoyên navbera delegasyona Kurd ii rejîma Bexdayê de agahdarî dabii serokên Kurd. Kurd careke in li ser pêşnîyari ii daxwazên Bexdayê li Şaqlawayê ni nav xwe de civîyan. Di dawiya civînê de bi tevayî gehîştin encamek ku mercên rejîma îraqê nayên qebiil kirin. Bi taybetî li ser bajarê Kerkiikê Kurd ii Ereb bi hevdu nakin. Kurd dibêjin Kerkiik bajarê Kurdan e ii îraq jî dibêje "na yê Ereban e". herweha ew guftiigoyên ku di navbera delegasyona Kurd ii rejîma Iraqê de bi mehan e dom dike, negihêşt encameke. Kurd niha xwe ji êrîşên îraqê re amade dikin.

Di girava Kendava Faris a bi navê Biibiyan de ku girêdayiyê Kuweytê ye, di nav leşkerên Kuweytê ii îraqê de şer derket. Qasî 80 leşkerên îraqê bi şev bi dizî çiin giravê. Di dema şer de îraqê çekên xwe li wir binerd kiriye ii leşkerên îraqê dixwazin bi dizî wan cekên veşartî ji wir derxin ii birevînin îraqê. Lê, leşkerên Kuweytê bi wan hesîyan ii şer di nav wan de derket. Di dawî de Kuweytiyan wan dîl girtin. Li ser vê şerê han Sekreterê Giştiyê Koma Neteweyan bala Amerîka kişand ser êrîşên îraqê.

Wek tê zanîn do Celal Talabanî PKKê bi rejîma Saddam re têkilîdanînê sucdar kiribii. îro berpirsîyarê PKKê yê Ewropa bersiva Celal Talabanî da:

-Celal Talabanî xewn û xeyala dibîne. Ev daxuyaniya Celal Talabanî derew e. Tû têkiliyên me li gel Saddam û
356
rejîma wî tune. Ceîal bi devê Tirkiyê dipeyîve.
Li bajarê Lahiyê qasî 50 Kurd bi turîstan re ketin xaniyê Konseya Aştî yê ya Navnetewî ii li dij operasyonên Tirkiyê ku li Kurdistana Başiir pêktîna ii hin jî dom dom dike dest bi çalakiyên riiniştinê kir. Di nav wan de zarok jî hene. Qasî çend saetan paşê dev ji tevgera riiniştinê berdan ii ji Xaniyê Konseya Aştiyê ya Navnetewî derketin.
Ew kesên ku di biiyerên cenezaya Wedat Aydin de li dîyarbekirê ji aUyê polîs ve hatibiin girtin, îro wan derxistin hember mehkemê. Yên ku wan derxistin hember mehkemê 370 kes biin. Girtiyan daxwaz kirin ku polîs ji salona mehkemê derkevin der. Li ser israra girtiyan mehkemê polîsan ji salonê derxist der ii mehkemê dest bi xebata xwe kir.
Mehkemê dixwaze bi doza bi şer ii biiyer derxistinê girtiyan siicdar bike. Girtiyên Kurd siic qebiil nekirin ii sedemên kuştin ii biiyer derxistinê polîs nîşan dan. Mehkeme dom dike.
l'ê Cotmehê
Li nêzî bajarê Cebexdirê PKK 5 turist revand. Di nav wan turîstan de Amerîkî, Awisturî ii îngiUz hebiin. Dewleta Tirk li herêmê dest bi operasyonan kir. Di operasyonan de 3000 leşker gelek polîs hene. Bi helîkopteran herêmê kontrol dikin. Lê, encam tune.
'2ê Cotmehê

Ji bo dîtina turîstan operasyon dom dike, lê bi ser tii rêçeke ve jî nebiine.

'3ê Cotmehê

Ji bo dîtina turîstan operasyon her berdewam e. îngiUstanê henekên xwe bi opeerasyona Tirkan kir ii got; 357

"Tirk wek di şikeftan de U derziyê bigerin. Ji xwe re li bin keviran digerin ku rastî turîst ii PKK bên" Ji aliyê din ve PKK li navbera Darahênê ii Miişê riya trênê girt. Polîsek hat kuştin ii trênê jî şewitandin. Ordî ii hêzên taybetî hatin herêmê. Di nav PKK ii wan de şer derket ii polîsek din jî li wir hat kuştin.

Bush dîyar kir, ku Amerika, hersê dewletên Baltik wek dewletên serbixwe dinase. Ji bo ku konsolosxaneyên xwe li wan hersê dewletên Baltik veke talîmat da wezîrê xwe yê Kariibarê Derveyî. Wek tê zanîn ii bîranîn hîn çendek berê Bush çiibiin Sovyetê ii li wir dîyar kiribii, ku" daxwazên serxwebûniyê nasyonalîzme û nasyonalîzma teng Jî tehîîke ye. Divê Komarên û gelên Sovyetê bi hevdu re bijîn.." Lê, niha Bush serxwebiina wan dewletan dixwaze.

'4ê Cotmehê

Tirkiyê ji bo dîtina turîstan hejmara leşker ii polîs li herêma Cebexçiirê derxist 5000'î. Heta niha qet rastî rêça wan nehatine. Qomiitanekî Tirk dibêje ku "di herêmê de bi gerîliayên PKKê re serîderketin gelek zor e. Wan grûbên biçûk pêk anîne û îi cihê xwe nasekinin, her tim bi hereket in. Em hew dibînin ku ji bin erdê derketin û şer kirin

û dîsa wenda bûn".
Niinerê Fransa ii îngiliztanê yên li Koma Neteweyan ji bo endametiya hersê dewletên Baltik arziihalek dan Sekreterê Giştiyê Koma Neteweyan.
'5ê Cotmehê
Iraqê dîyar kir ku qaniineke bingehî ya nii deranî. Li gor daxuyaniya îraqê, îraq bi vê qaniinê re dikeve prosesekî demokratîk. Ji derî BAAS partiyên din jî dikarin bên da-
358
mezrandin. Lê, ji aliyê din ve, di vê qaniina bingehî ya nii de dinivîse ku kîjan partî polîtîka herêmî, parvekarî an jî ya dînî bike, ew partî tê qedexekirin. Heger ew partiyên ji derê BAAS bi welateke derve re an jî bi hin partî ii hêzên derî îraqê re têkilî dênin, ew dîsan qedexe dibin ii tên girtin.
Gotinên "herêmî" û "parvekarî" ji bo partiyên Kurdan ii ya "dînî" ji bo Şuyan e. Yanî Partiyên Kurd ii Şuyan qedexe ye.
Celal Talabanî li Silêmaniyê daxuyaniyek da çapemeniyê ii got ku:
-Bi Saddam bawerî nabe. Dikare her tiştî bike. Ew naxwaze petrolê par bike. Demokrasiyê bîne. Em dê dest bi şer bikin. Li pişt me Jî hêzên Çalak heye.
Koma Neteweyan dest bi îzna firotina petrola îraqê da.
Dê di 6 mehan de 2 milyar ii 400 milyon dolar petrol bê firotin.
Ev dê ji xeta Tirkiyê de bê firotin ii para Tirkiyê jî jê bê girtin.
Turîstên ku li herêma Cebexçiirê ji aliyê PKKê ve

hatibiin girtin hîn jî agahdarî ji wan tune. Operasyona Tirkan jî li herêmê dom dike. Encam nîne.

359

Çi dîtin û çi bihîstin

Gelek Kurd ji Swêdê diçin Kurdistana Başiir ii bi paş ve tên. Di van rojên dawî de Nasir Razazî, Kovan (li ser navê Bere beşdar bii), Cemşîd Heyderî ii Sîrvan jî çiibiin Kurdistanê ii hema hema li seranserê Kurdistana Başiir geriya biin. Ji wan çend kes li gelek bajar ii cihan konser, semîner ii civîn çêkiribiin. Wan bi gel re sohbet kiribiin keser, êş, daxwaz ii hêviyên wan guhdarî kiribiin. Ji rewşa welat foto ii fîlim girtibiin ii anîbiin Swêdê. Redeksîyona Berbangê xwest ku bi wan hevalan re, li ser rewşa Kurdistana Başiir kombiinekê sohbetî pêk bîne. Ji Berbangê jî Cemal Batun ii Amed Tîgrîs beşdarbiin. Cemal Batun kombiina sohbetetî îdare kir. Em bi kurtasî vê sohbeta ha U jêr pêşkêş dikin.

Berbang: Wek em hemii pê dizanin, ji meha adarê ve heta niha hukimeta îraqê li Kurdistana Başiir kontrola îdarekirinê winda kirîye. Gelo Bere (Cephe) an hêzên Kurd di şiina vê valabiinê de çi îdare danîne an ava kirine? Organên îdarekirina herêmê çi ne?

Nasir Razazî: Bi dîtina min divê mirov berê behsa şêweyê raperînê (serhildanê) bike. Raperîn xwe bi xwe dest pê kir ii paşê hêzên pêşmêrge

ketin navê ii girtin bin kontrola xwe. Raperin bi
tenê ne li Kurdistanê bii; herweha li başiirê Iraqê
şîîyan jî desthilda. Niha jî di navbera hêzên çep
ii yên netewî ii demokratîk de dîtinên cuda cuda
hene. Yên netewî yanî wek yên ku di nav Bereyê
Kurdistanê de dixwazm diberxwe bidin ii bi aliyê
din de jî bi rejîma Bexdayê re guftiigoyan
pêkbînin. Lê , yên çep dixwazin xelkê îraqê komê
360
serhevdu bikin ii rejîma îraqê bixin. Yanî ew
naxwazin bi Saddam re guftiigoyan çêbikin.
Kovan: Li Kurdistanê kontrol roj bi roj tê guhartin.
Barê bingehî ii giştî yên jîyana gel e. Li
navê qaniin tunin. Qaniina dewleta îraqê niha
nayên bi karanîn, lê qaniinên Kurdan jî tunin
berî demekî Bere gelek lawaz (qels, zeyîf) bii, lê ji
mehek şiin ve gelek ber bi başiyê ve diçe.
Cemşîd Heyderî: Nasir got di serî de U Kurdistanê
hêz tune biin, lê mirov divê hoyan bide ber
çavan. Belê her çiqas hêz bi awayeld vekirî nexwuyabiin
ii qels biin jî, lê dîsan bi dizî li gund ii
bajaran rêxistinên wan hebûn.
Sîrwan: Ez taze ji Kurdistanê têm, hê hefteya
min tije nebii. Bere dest bi organîzekirina gel
kirîye. Belediye hene ii dixebUm. Dibistan herweha.
Bere poUsê parastin, nasname (kîmUk) ii paspaport
kontrolkirinê jî avakirîye. Dixwazin
leşkerên îdarî çêbikin. Dest bi çekirin ii

tamîrkirina çekna kirine ii di vî warî de qursên hînkirin ii perwerdeyî vekirine ii caman wan qursan di TV de jî şan didin.
Cemşîd Heyderî: Dezgeh (muesese) ii îdareyên ku hene hîn jî yên kevin in ii bi aliyê aborî ve jî bi dewletê ve girêdayî ne. Niha dewlet nikare wan kontrol bike. Ew di bin kontrola Bere de ne. Dixwestin li Dihok ii Zaxo qeymeqam hilbibjêrin, lê ez nizanim çi bii.
Kovan: Di bingehê xwe de tixiibên kontrolê ne bi paralela 36-an ve girêdayî ye. Hinek cih hene ku di nav paralela 36-an de ne lê kontrol di destê îraqê de ye ii hinek cih jî hene ku li derê paralela -36an de ye, lê, kontrol di destê pêşmêrgeyê Bere de ye. Wek Xaniqîn, Kerkiik... Lê mirov dikare
361
bêje ji %70-80 axa Kurdistanê di bin kontrola hêzên Bere de ye.
Cemşîd Heyderî: Belê otorîte di destê hêzên pêşmêrge de ye
Berbang: Gelo hêviya xelkê çi ye, li gel guftiigoyên Bexdayê ye an na?
Sîrwan: Li Kurdistanê ji her pîşe (meslek) ii çînî li gel raya Bere re ye. Wek mînak Hakimê bajarê Silêmaniyê bi xwe, U ser navê Bere, di nav delegasyona guftiigoyan de çiibii Bexdayê.
Nasir Razazî: Xelk ne li dij guftiigoyan e,lê Bere ii hêzên Kurdistana îraqê xelkê ji guftiigo ii

biiyeran agahdar nakin, bi dizî digrin. Xelk ji vê yekê eciz e. Pêşmêrge bi xwe tiştek nizane.
Kovan: Di destê me SIFO an jî statîstîk tunin, ku mirov bizanibe ji sedî çiqas U gel ii ji sedî çiqas jî li dij guftiiyoyan in. Ra ii hêviya xelkê bi ya pêşmêrge ve U gel guftiigoyan in. Lê dibe ku hinek li gel Bexdayê guftiigoyan nexwazin. Bere xelkê di derheqê guftiigoyan de bi radyo ii belavokan agahdar dike. Heta bi telefonê me yên Ewropayê jî di demê de agahdar dikin.Belê bi şewekî aktîv guftiigo hatine rawestanin, lê bi şêweyê name ii nivîskî her berdewam e.
Nasir Rezazî: Ez ji kek Kovan dipirsim kengê ii çawan xelkê ji guftiiyoyan agahdar kirin?
Sîrwan: Ez dixwazim bersiva te bidim, ji ber ku ez niha ji Kurdistanê têm. Niha hem Partî ii hem jî Yekîtî Nîştîman di cîh de hem endamên xwe ii hem jî xelkê agahdar dikin.
Nasir Razazî: Piştî ku guftiigo têkçîin weha bii çavên min. Berê tiştekî weha tunebii.
Cemşîd Heyderî: Heta Konferansa Şaqlaweyê agahdarî digihêşt xelkê. Di kombiinê de Bere
362
biryar girtibii, ku li Bexdayê delegasyon ii hukimeta îraqê dema li ser kîjan xal bi hevdu bikin, dê wê ji raya gel re eşkere bikin. Lê, di dema guftiigoyan de Bexdayê vê biryarê qebiil nekir ii got ku " heta ku em li ser hemû xalan li hevdu

nekin, dîyarkirina xal bi xal nabe." Rojnameyên
îraqê yên rojane her roj dihatin Kurdistanê. Wan
li gor xwe dinivîsand. Lê Bere tiştek ne digot ii
ne dinivîsand. Divê xelk ji Bere fêr biban, ne ji
îraqê ii dezgehên din. Piştî civîna Mam Celal a
Hewlêrê ya Tebaxê êdî her kes behs dike.
Niha bîr ii raya Celal Talabanî ii ya Mesiid
Barzanî di vî warî de ne yek e. Celal Talabanî
dibêje, "xelk guftiigoyan naxwaze" ii Mesiid
Barzanî jî dibêje, " na gel guftiigoyan dixwaze".
Lê, ya herî dilxweş ew e, ku herdu hêzên sereke
çi dibe bila bibe, bi yek alî bi rejîma îraqê re
riinanin. Divê bi hevdu re biryar bigrin ii bi
hevdu re hereket bikin. Ya herî baş jî ev e.
Berbang: Baş e, dê daxwaza gel çawa bê zanîn?
Gelo dê referandiim çêbe?
Kovan: Meseleya referandiimê hîn baş ne dîyar
e, lê bi telefonê ji me re gotin, hewldaneke weha
heye. Mesiid Barzanî dibêje ku, heger me vê meseleya
berdewambiina ii ne berdewambiina
gutfûgoyan di nav xwe de bi hevdu kir, wê demê
em serî li referandiimê naxin, lê heger me bi
hevdii nekir, wê demê divê em herine referandiimê.
Berbang: Wek em pê dizanin zivistan hat. Kurdistan
wêran e ii avayî ii xanî nînin. Xelk tazî,
birçî ii li der e. Gelo hêzên Hevkar (Mutefîk) an
363
jî Bere ji bo penaber ii derbederan xanî çêkirine

an jî xelk bi xwe di vî warî de di nav çi xebat ii lebatê de ye?

Nasir Razazî: Heta 2 meh berê jî U navçeyên azadkirî tii xanî an avayî ne hatibii çêkirin. Lê belê, xelkê li hinek cihan bi teneke ii textikan ji xwe re wek holikan tişt çêkiribii. Di gotin ii hêvî dikirin ku, dê Ewropî ji me re xaniyan çêbikin.

Sîrwan: Na, niha FN (Koma Neteweyan) U hinek herêman dest pê kirîye, li gor hejmara malbatan, texte, çînko ii malzemeyên xanîlêkirinê li xelkê belav dikin. Yên ku dikarin bi xwe yên ku nikarin jî, bi alîkariya FN an jî bi alîkariya pêşmêrgeyan ji wan re xanî ava dikin. An jî tamîr dikin. Heger weha dom bike, ez bawer im dê heta 2-3 mehan bikarin ji bo derbasbiina zivistanê tedbîr bigrin.

Berbang: Heger ev rewşa sîyasî li Kurdistana Başiir ii Iraqê çend salan weha dom bike ii bi guftiigoyan negîhêne encamek, gelo Bere ii hêzên Kurd dê ji bo çareserkirina pirsa Kurd, polîtîkayekê çawa bidine pêş xwe?

Kovan: Polîtîka Bere ne şer ii ne jî aştî ye. Ji ber ku herdu jî ne bi me ve girêdayî ne. Ax di di bin destê me daye, lê dunya bi me re aUkariya sîyasî nake. Sê milyon Kurd niha perîşan in. Projeya Bereyê Kurdistanê ew e , ku xelkê Kurd, xwe bi xwe, xwedî ii îdare bike. Ji ber ku tecriibeyê me hene Ji sala 1981 'ê ii heta 1987'an deverên berfirehên

azadkirî îdare kiriye. Niha rewş komplek-

stir e. Dirgayê rewşa, Tirkiye, Suriye, îran ii heta girêdayê rewşa cîhanê ye. Divê Kurd yek bin ii nehêlin ku hukim ii îdare bikeve destê hezên din. Wek em pê dizanin gelek plan li ser îraqê hene. Dixwazin wê bikin wek Lubnanê.

Nasir Razazî: Bi aştî pirsa Kurd çareser nabe. Heta ku mafê çareniis neyê girtin, pirsa Kurd çareser nabe. Divê em raya giştiya cîhanê bistînin. Bi otonomiyê ev yek çareser nabe....

Cemşîd Heyderî: Dema bi riya aştiyê pirs çareser nebe, paşî dîsa, mirov dikeve nav bela ii probleman. Ji bo avakirina Kurdistanê jî aştî pêwîst e. Hukimeta îraqê dibêje ku tevayiya îraqê wêran biiye. Kurdistan jî herêmek jê ye. Yanî ji bo Kurdistanê xalekê taybetî yê avabiinê nîne. Heger guftiigo bi serbiketa hukimatê ji bo Kurdistanê musaeda alîkarî ya taybetî bikira. Programa Bere otonom e. Divê mirov li gor programa Bere gotiibêj bike.

Berbang: Piraniya ew kesên ku diçin Kurdistanê ii tên dibêjin ku " U Kurdistanê dizî, talan ii werankirinekê bê ser ii ber heye." Gelo ev rast e?

Cemşîd Heyderî: Belê pêşî li nav bajêr gelek biin, lê niha rê lê girtine. Li Kurdistanê bi tenê hêzên pêşmêrge çekdar nînin. Lê niha pêşmêrge kontrol dikin. Kak Mesiid bi xwe li Silêmaniyê di

axaftina xwe de dibêje " "Divê em di vî warî tedbîr bigrin ii hiin ji me re alîkariyê bikin ku dizî ii talan nebe".
Kovan: Rast e, di destpêkê de talanên mezin biin. Bere pêş lê girt. Di destê hêzên Kurd de qaniin tune bii. Bi urf ii edetan herêma Kurdis-
365
tanê îdare dikir. Lê niha pêş lê girtine ii bi awayekê pozîtîv dimeşe. Divê qaniin bên sazkirin.
Sîrwan: Komîteyên şoreşê hene otomobîl ii kamyonên ku di sînoran de derbas dibin kontrol dikin. Bi taybetî sînorê Tirkiye ii îranê. Li nav bajaran jî kaxezên otomobilan kontrol dikin.
Mesela yê ku otomobîlek bidize 10 sal ceza didinê. Bi taybetî di van hefteyên dawî de qet biiyerên weha çênebii.
Cemşîd Heyderî: Ew projeya ku Kak Amed behs kir projeyekê nîv eskerî bii, ne ya enerjî. Heger hukimeta îraqê wê 400 metre bilind bikira, demê dê navçeyekê gelekê mezin binav biibiiya. Di wê projê de gelek kamyon, buldozer ii aletên din hebiin. Di projê de çêkirina 200 xaniyên modem hebiin. Tê gotin ku ev firotine axayek ii axa jî firotiye îranê. Lê çiqas rast e yek nizane. îspat tune, lê xelk dibêje firotine...
Berbang: Belê, di nav rewş ii hoyên hewqas dijwar de, gelo rewşa çapemenî ii hunermendiyê çawa ne?

Cemşîd Heyderî: Heta meha 8-an rewşa
çapemeniyê li Kurdistanê gelek ne baş bii. Mirov
dikare bêje hîç tiştek derneçiibii. Li Hewlêr
çapxenekê gelek mezin hebii, hêzên Kurd dikaribiin
li wir tiştên xwe çap bikin, lê mixabin nekirin.
Lê, piştî meha 8-an kovar ii weşanên Kurd
dest bi weşanên xwe kirin. Wek ku wê rojê min
dît rojnama Xebat, Rêbazî Nîvê, Şerare, Rêgahî
Azadî, Alayê Azadî, Rêgahê Kurdistan, Berê Kurdistan
derketine... Li Dihok, Hewlêr, Şeqlewa,
366
Silêmaniyê Yekîtiya Nivîskar, Yekîtiya Jinan,
Yekîtiya Xwendekar ii Hunermendan hene.
Berbang: Bi dîtina we, ev dirêjbiin ii têkçiina
guftiigoyan, ji bo Kurdan baş bii an ne baş?
Cemşîd Heyderî: Dirêjbiin di xizmeta Kurd de
nîne.
Kovan: Bi raya min ev diçe, lê caman pingar
dibe. Berdewambiin erênî ye. Pozîtîv e. Her çiqas
guftiigo dîrekt hatibin birîn jî, lê bi awayekî din
dimeşe. Wek name ii tiştên nivîskî...
A.Ttgrîsû CemalBatun
Artêşa Tirk dîsa Êrîşê
başûrê Kurdistanê Kir
Artêşa (ordiya) Tirk a dagîrker, di nav vê mehê de, du
car li pey hev êrîşê başiirê Kurdistanê kir. Ew çalakiyên
PKK yên nêzî tixiibên Kurdistana başiir ii Bakur dibin
sedem şan dide. Wek tê zanîn çend roj berî êrîşê, PKK li

nêzê tixiib di çalakiyekî de 17 leşkerên Tirk kuştibii. Di vê êrîşa dawî de, Biilent Ecevît bi awayekî vekirî armanca dewleta Tirk da xuya kirîn:

-Divê Artêşa Tirk Ji bakurê îraqê dernekeve. Wê herêmê Ji xwe re bike herêmekî rizgarkirî. Di çend mehan de carek operasyon encameke negatîv ji Tirkiyê re neayîne.

Erîşkirina Başiirê Kurdistanê ji artêşa Tirk re biiye riya kaniyê. Dewleta Tirk, her ku dikeve tengasiyê bi balafir, top ii tanqên xwe ve berê xwe dide başilrê Kurdistanê.

367

Wek her carî, dîsa ji 20'ê meha cotmehê ve, li başiirê Kurdistanê cihwarê sivîl bombebaran dike ii gelek kesên sivîl hatin kuşt. Encama êrîşê, wek yên berê fîyasko bii.

Li ser vê êrîşa dawî Mesiid Barzanî daxuyaniyek da ii bi zimanekî tiij êrîşa Tirkan protesto kir. Mesiid Barzanî di daxuyaniya xwe de got ku:

-Artêşa Tirk cihên sivîî gulebaran dike. Yek jê Jî ew e, ku gundê ku ez îi wir Ji dayîkbûme gulebaran kirîye û gelek kesên sivîî hatine kuştin. Em bûyerê protesto dikin û têkiliyên xwe ji Tirkiyê qut dikin...

Celal Talabanî jî çii Ankarê ii bi serokwezîrê Tirkiyê Mesut YUmaz re peyîvî. Ew, bi pişt re jî Siileyman Demirel dît. Celal Talabanî jî êrîşa artêşê protesto kir. Talabanî di daxuyaniya xwe de got:

"Eu êrîşa artêşa Tirk têkiliyên navbera bereyê Kurdistanê û Tirkiyê xerab kir. Peymana ku di nav me de hatibûn îmzakirin Tirkiyê bi vê êrîşê, bi yek aîî xerab kir.

Em dê buroya xwe ya îi Ankareyê bigrin û mirovên xwe yên berpirsîyar Jî bi paş ve bikşînin" .
Piştî hevdîtina Celal Talabanî ii Siileyman Demirel, Siileyman Demirel daxuyaniyek da:
"Divê mirov Kurdên mêrkuj û yê hemwelatî ji hevdu cuda bike".
Li başiirê Kurdistanê biiyer hêdî hêdî kêm biin. Herweha pirsa Kurd wek berê ji rojeve cîhanê derket. Di dav^dya havîna 1991'ê de, Saddam ji Kurdistanê hêz ii karmendên xwe kişand. Ambargoya aborî danî ser Kurdistanê. Ambaroya Saddam li seranserê Kurdistana Başûr tesîra xwe

nîşanda. Bi taybetî ji aliyê petrolê ve jîyan li Kurdistanê hema hema rawesta. Bereyê Kurdistanê li dij ambargoyê daxuyaniyên protestoyî dan. Carek Samî Abdurrahman ii carek jî Mesiid Barzanî li ser navê xwe çiin Bexdayê. Lê encameke pozîtîv ji çiinên wan demeket ii rewş nehate guhartin.
Piştî bi paş ve kişandina karmendên Saddam, li Kurdistanê valahiya îdariya sivîU jî derkete holê. Li ser vê rewşa nii, Bereyê Kurdistanê di nav xwe civiya ii ji bo valayiya îdarekirina herêmê ya sivîlî biryar girt. Bere civandina parlementoya Kurdistanî girt. Ji bo hilbijartina endamên parlementoya Kurdistanê Komîta Amadekirina Hilbijartina Giştî hat damezrandin. Komîtê dest bi kar ii barê xwe kir. Dê di 3'ê Nîsana 1992-an de hilbijartina giştî li Kurdistana Başiir pêk bê. Endamên parlementoya Kurd bên hilbijartin. Di meha 2'ê 1992-an de Mesiid Barzanî U ser

daweta Tirkiyê bi helîkoptera hêzên Hevkar hat Kurdistana bakiir ii ji wir jî bi balafirê hat Ankarê. Mesiid Barzanî, Serokwezîr Siileyman Demirel, Wezîrê Kariibarên Derveyî Hîkmet Çetin, Serokkomar Turgut Özal ii gelek kesên dît ii bi wan re qise kir. Mesiid Barzanî U Ankarê di roja 23. 2. 1992-an de bi rojnamevanan re presskonferansek çêkir. Mesiid Barzanî di presskonferansê de bi kurtasî van tiştan got:

-Em li Kurdistana îraqê dewleteke serbixwe naxwazin. Em di nav îraqê de otonomiyeke rasteqîn dixwazin. Em naxwazin Ji îraqê biqetin. Hilbijartina parlementoya me ya meha Nîsanê, ne alternatîvê parlementoya Iraqê ye. îraqê niha Ji herêma me hemû karmendên (memûrên(xwe bi paş ve kişandîye. Valayiyeke îdarî çêbûye. Em dixwazin parlementoya ku pêk bê vê valayiya îdarî tije bike. îdara sivîîiya herêmê bigirê ser miîê xwe û bi hukimeta îraqê ya navendî re pêwendiyan bimeşîne.

369

Rojnamevanan li ser têkiliyên wan ii PKK pirsekê ji M. Barzanî kirin. Bersiva Mesiid Barzanî weha bii:

-Em nikarin tixiibên Tirkiyê biparêzin. Em li dij metodên PKKê ne. Em, wek Bere li dij terorîzmê ne. Heger PKK dev ji şerê çekdarî berde ii bixwaze bibe rêxistineke polîtîk, wê demê em dikarin li herêma xwe cîh bidine wan.

Di dezgehên ragihiştandin ii çapemeniya cîhanê ii Kurdan de pirsa Kurd ket nav bêdengiyeke mezin. Ji ber vê yekê, me jî dawî da notên xwe yên rojane. Me xwest,

ku em li vir xalek dayînin.
370
Saddam êrişê Kuweytê klr û
wê da^ klr.
Koma Neteweyan
dagirklrina Kuweytê protesto
klr. Ambargoya aborî û leşkeri^,
li ser Iraqê danî. Dîsa Jî Iraqê""*^
1e ş k e r ê x w e J i' , ;
Kuweytê nekişand. Amerika û " i/
hêzên Hevkar di hewa de, bi£*!* ' ,
çekên nûjen Iraqê bomba^-
klrin. Di dawl de, bi operasyo' , ' ,, ; -
na erdê re hêzên leşkerî yên^
Iraqê, Ji Kuweytê hatin derxls^ -
tin. " Kuweyt rizgar bû." Iraq J' ^^*^
têkçû. Hat wêran kirin-^^ », " .
Ji başûrê ve Şû û Ji bakur ve^. ^"
Jî Kurdan dest avêtln çek. Di
navt>era hefteyekê de Kurdan Ji'
'90 %ê başûrê Kurdistanê " "^ " w" .
rlzgarklr. -A-l^ ^< ^^^ '
Hêzên Hevkar ûAmerîkaJl* ^" -^^[^
serîhildana Kurd û Şîîyan ^ -"^^^* 2i/. -
tirsîyan. Çav li Iraqê * g j^
şikandin. Iraqê bi balafir, 'Iê^ A^
helîkopter û scutan Kurdls- ^»« ' V
tanê xopan kirin. Qasî 2 . ^- - flLj-^~ '

milyon Kurd ber bi tixûbên' '
Iran û Tirkiyê ve reviyan. Tra-
Jedlyeke mezin dest pê kir. Bi ' V*t
hezaran zarok, kal û pîr U ser, «&
çiyayên Kurdistanê, di nav berf ^4~ ^ *
û sermayê de mirin.
Dinyayê temaşa mirina,
Kurdan kir. Vê carê hêzên_
Hevkar û Amerîka bi balaflran\
Ji Kurdan re nan û xwarin
avêtin. Xwestin xwe humanîst
nîşan bidin.
Mirov dikare roj bi roj, bi
awayekî vekirî û objektîvî wan lîstik û trajediyan di vê pirtûka han de bibîne. Dîsa mirov dlkare di vê pirtûkê de, li hember vê barbarî, trajedî û lîstikên han, li welêt û li derê welêt Kurd û serokên wan çi gotln û çi kirin, bibîne.
Ev dîroka çend mehan e, lê dikare dîrok û polîtîka çend sedsalan bide dîyar û zelal kirin.
**

ŞOREŞA BÊDENG

Envantera Guherîn û Veguherîna
Demokratîk Ya Tirkiye Yê
2002-2012
Komara Tirkiyê
Serokwezîrtî
Misteşarîya Ewlehî û Pergela Gel
ŞOREŞA BÊDENG

2

ŞOREŞA BÊDENG

Envantera Guherîn û Veguherîna Demokratîk Ya Tirkiyê Yê

(2002-2012)

Ji Tirkî Werger: Mehmet ÖZTUNÇ

Weşanên Misteşariya Ewlehî û Pergala Gel: 9

1.Çap, Berfanbar 2013

ISBN: 978-975-19-5898-3

Misteşariya Ewlehî û Pergala Gel Ya Serokwezîrtîyê

Koma Xebatên Polîtîkayên Demokratîkbûnê

2013

2002-2012

3

NAVEROK

RASTEKA KINKIRINÊ 7

PÊŞGOTIN 9

PÊŞKEŞ/Recep Tayyip ERDOĞAN, Serokwezîr 13

TEQDÎM/Beşir ATALAY, Alîkarê Serokwezîr 17

DESTPÊK/Ulvi SARAN, Misteşarê Ewlehiyê û Pergala Gel 21

BEŞA YEKEMÎN

PÊVAJOYÊN DEMOKRATÎKBÛNÊ YÊN HEYAMÊN

DI NAVBERA SALÊN 2002-2012 AN DE 27

DI HEYAMA NÊZ DE PÊVAJOYA MAFÊN MIROVAN Û

DEMOKRASÎYÊ YA TIRKIYE YÊ 29

Makezagonên 1961 û 1982yan 31

Pirsgirêka Wesayetê 32

Dewleta Hiqûqê û Daraz 33

Bilindkirina Standardên Demokrasîyê, Jiholêrakirina
Wesayetê û Sivîlbûn 34
Di Pêvajoyên Demokratikbûnê De Bandora Yekîtiya Ewropayê 38
GUHERTINA PARADIGMAYA EWLEHIYÊ 41
Rakirina Rewşa Awarte 44
Rakirina Dadgehên Ewlehiya Dewletê û Dadgehên
Xwedî Rayeya Taybet 46
Destpêkirina Projeya Yekîtiya Neteweyî û Biratiyê 47
Avakirina Misteşariya Ewlehî û Pergala Gel 48
Lêvegerîna Mafên Kesên Ji Welatîbûnê Hatine Derxistin 49
Hêsankirina Jiyana Rojane 49
Lêvegerandina Navên Deverên Kevin Yên Hatibûn Guhertin . . . 50
Bi Jiholêrakirina Jênebaweriya Welatiyan Kêmkirina
Bîrokrasiyê 50
PÊNGAVÊN DI QADA ÇAVNÊRÎ Û VENÊRÎNÊ YA SIVÎL DE
HATINE AVÊTIN 55
Ji Aliyê Gel Hilbijartina Serokomar 58
Ji Bo Sekreterê MGKê Bibe Sivîl Serastkirin 60
Tengkirina Qada Rayeya Daraza Eskerî 60
Rakirina Protokola EMASYA 61
Bidawîkirina Sepandina Endamên Eskerî Yên Di Hin
Sazîyan De 62
Li Dijî Biryarên Şûreya Eskerî Vekirina Rêya Darazê 62
Vekirina Rêya Darizandina Derbekarên 12ê Îlonê 63
Şoreşa Bêdeng
4
Di Bin Banê Meclîsa Mezin Ya Gel Ya Tirkiyê (TBMM)

De Avakirina Komîsyonên Lêkolînê 64
PÊNGAVÊN KU DI WARÊ PARASTIN Û PÊŞXISTINA MAFÊN MIROVAN DE HATIN AVÊTIN 65
Politîkaya Ji Îşkencê Re Sifir Tolerans 70
Dawîkirina Bûyerên Kuştinên Kiryar Nedîyar 71
Ji Rojeva Welêt Derxistina Mafya û Çeteyan 72
Rakirina Cezayê Mirinê 72
Li Gor Biryarên Dadgeha Mafên Mirovan Ya Ewropayê Vekirina Rêya Nûkirina Darizandinê 73
Li Hember Hiqûqa Navxweyî Qebûlkirina Serdestiya Girêbestên Navneteweyî Yên Derbarê Mafên Bingehîn De 74
Pejirandina Mafê Wergirtina Agahiyê 74
Li Gor Peymana Mafên Mirovan Ya Ewropayê Pêkanîna Azadiya Rêxistinbûnê 75
Berfirehkirina Derfeta Bikaranîna Mafên Çalakî û Xwepêşandanê . . 76
Ji Bo Weqfên Cemaetên Hindike Hêsankirina Bidestxistina Milk û Firehkirina Qadên Azadiya Wan 76
Dayîna Mafê Serlêdana Şexsî Ji Bo Makezagonê 77
Rakirina Tengbûnên Venêrîna Darazê 78
Biewletirkirina Parlementertî û Partiyên Sîyasî 79
Sazkirina Lijneya Venêrîna Gel 80
Sazkirina Lijneya Mafên Mirovan Ya Tirkiyeyê 81
Hêzdarkirina Mafên Zarokan 81
Hêzdarkirina Mafên Jinan 82
Zêdekirina Cezaya Bikaranîna Hêza Bêpîvan 84
Başkirin û Serastkirina Şertên Binçaviyê (Başkirina Mafên Gumanbaran) 84
Girtina Girtîgehên Ku Ne Li Gor Standardên NY û Konseya

Ewropayê Ne 85
Ji Girtî û Hukimxariyan Re Dayîna Derfetên Beşdarbûna Cenazeyê Xizmên Xwe û Di Rewşa Nexweşiya Giran De Dayîna Derfeta Serîlêdanê 85
REFORMA DARAZÊ 87
Demokratîkkirina Binesaziya Lijneya Bilind Ya Dadger û Dozgeran 90
Demokratîkkirin û Piranîparêzkirina Binesaziya Dadgeha Makezagonê 92
Hêzdarkirina Azadiya Îfadekirin û Azadiya Çapemeniyê-Weşanê 93
Ji Bo Darizandina Bi Dadî û Bilez Serastkirin 94
2002-2012
5
Ji Bo Hêzdarkirina Azadî û Ewlehiya Kesayetiyê Serastkirina Dadgerên Azadiyê 94
Sazkirina Dadgehên Malbatê 95
Firehkirina Sepandina Qada Serbestiya Bi Venêrînî 95
FIREHKIRINA MAFÊN ÇANDÎ Û PÊNGAVÊN KU JI BO DEMOKRATÎKKIRINA QADA PERWERDEHIYÊ HATIN AVÊTIN 97
Derfeta Hînbûn, Xurtkirin, Pêşvebirin û Weşana Ziman û Zaravayên Cuda 101
Ji Bo Hukimxwar û Girtîyan Li Girtîgehan Bi Malbat û Xizmên Xwe Re Pêkanîna Bi Zimanên Zikmakî Axaftin û Hevdîtin 102
Ji Bo Hemwelatîyên Me Rakirina Hemû Qedexeyên Li Ber Navdanîna Zarokên Xwee 102
Li Zanîngehan Derbarê Ziman û Zaravayên Cuda De Pêkanîna Lêkolînên Zanîstî, Sazkirina Enstîtuyan û Anîna Dersa Bijarte . 103

Rêvekirina Pêşiya Di Ziman û Zaravayên Cuda De Propagandayê . 104
Rakirina Qedexeyên Li Ser Berhemên Sînema, Vîdeo û Muzîkê 104
Piştgirîdayîna Feeliyetên Çandî Yên Bi Zimanên Cuda 105
Ji Bo Sûdewergirtina Ji Xizmetên Gelemperîyê Îstihdamkirina
Wergervan û Sazkirina Navendên Bangewaziyê 105
Ji Aliyê Dewletê Ve Îstixdamkirina Meleyan 106
Demokratîkkirina Pergala Perwerdehiyê 106
Zêdekirina Hejmara Zanîngehan û Kontenjanên
Hîndekariya Bilind 109
Ji Holê Rakirina Sepandina Pûandayîna Cuda Yên Ku Di
Ezmûna Ji Bo Têketina Zanîngehan Dihat Sepandin 111
Li Zanîngehan Serbestiya Cil û Bergan 112
Rakirina Dersa Agahiya Ewlehiya Neteweyî 112
PÊNGAVÊN DI WARÊN CIVAKÎ-ABORÎ DE HATIN AVÊTIN . . 115
Nîşaneyên Aboriya Makro û Pêşketina Aborî 119
Pêngavên Di Warê Tendûristiyê De Hatin Avêtinn 123
Pêngavên Ji Bo Ewlehiya Civakî û Tenduristî Ya Welatiyan
Hatin Avêtin 126
Zêdekirina Hejmara Balafirgeh Seferên Hewayê û Rêwiyan 127
Hêsankirina Trafiqa Rêbêjeyî û Zêdekirina Rêyên Dabeşkirî . . . 128
Projeyên Trêna Bilez û Zêdekirina Dirêjahiya Rêyên Hesin 129
Zêdekirin û Belavkirina Projeyên Avahiyên Komî 130
Pişgirîdayîna Projeyên Ji Bo Binesaziyên Gundan (KÖYDES) . . 131
Piştgirîdayîna Projeyên Ji Bo Binesaziya Şaredariyan (BELDES) . . . 132
Programa Piştgirîdayîna Civakî (SODES) 132
Şoreşa Bêdeng
6
Ajansên Pêşketinê 133

Têkoşîna Bi Xizaniyê Re û Sepandinên Alikarî û Pişgirîdayîna Civakî 133
Pêngavên Ji Bo Xizmên Şehîd, Xazî û Ji Bo Mexdûrên Terorê Hatin Avêtin 137
Pêngavên Ji Bo Hêsantirkirina Jiyana Astengdaran 139
Ji Bo Komên Xwedî Dezavantaj Sepandina Firehkirina Cudakariya Pozîtîf 142
Li Rohilatê û Başurê Rohilatê Anatolyayê Zêdekirina Razemeniyên Gelemperîyê 143
Bi Projeya Başurê Rohilatê Anatolyayê (GAP) Pêşveçûna û Zêdekirina Refaha Li Heremê 143
Projeya Vegera Gundan û Rehabîlîtasyonê 145
Ji Bo Mexdûrên Terorê Dayîna Tezmînatên Zirarê 146
PÊNGAVÊN KU DI WARÊN HÊZDARKIRINA RÊVEBIRINÊN HERÊMÎ DE HATIN AVÊTIN 149
Mewzuata Rêveberinên Herêmî Ya Nûjen û Nû 152
1. Qanûna Şaredariyan Ya Bi Nomreya 5393 153
2. Qanûna Şaredariya Bajarên Mezin Ya Bi Nomreya 5216 . . 153
3. Qanûna Rêvebiriya Taybet Ya Bajêr Ya Bi Nomreya 5302 . 154
4. Qanûna Yekîtiya Rêvebiriyên Taxî Ya Bi Nomreya 5355 . . 154
5. Qanûna Derheqê Ji Hatiniya Baca Bûtçeya Giştî Pardayîna Rêvebiriyên Taybet Yên Bajêr û Şaredariyan De 155
Bi Armanca Ku Demokrasî Di Asta Devertî De Hêzdar Bibe Jinûve Serastkirina Sînorên Bajarên Mezin 155
ENCAM 157
BEŞA DUYEMÎN
ENVANTERA VEGUHERÎN Û GUHERÎNA TIRKIYE YÊ (2002-2012) . . 163

2002 167
2003 175
2004 189
2005 197
2006 203
2007 209
2008 213
2009 217
2010 223
2011 233
2012 241
2013 251
2002-2012
7
RASTEKA KINKIRINÊ
YE (AB) : Yekîtiya Ewropayê
DMME (AİHM) : Dadgeha Mafên Mirovan Ya Ewropayê
PMME (AİHS) : Peymana Mafên Mirovan Ya Ewropayê
KE (AK) : Konseya Ewropayê
PPBŞ (BELDES) : Projeya Piştgirîdayîna Binesaziya Şaredariyan
NY (BM) : Neteweyên Yekbûyî
QDC (CMK) : Qanûna Dadrêsiya Cezayê
QÛDC (CMKU) : Qanûna Ûsila Dadrêsiya Cezayê
DED (DGM) : Dadgeha Ewlehiya Dewletê
PAAE (EMASYA) : Protokola Alîkarî-Asayîş-Ewlehiyê
QDH (HMK) : Qanûna Dadrêsiya Hiqûqê
LBDD (HSYK) : Lijneya Bilind A Dadger û Dozgeran
QÛDÎ (İYUK) : Qanûna Ûsila Darizandina Îdarî

PRVG (KDPR) : Projeya Rehabilîtasyon û Vegera Gundan
BHQ (KHK) : Biryarnameya Di Hukmê Qanûnê De
PPBG (KÖYDES) : Projeya Pişтevaniya Binesaziya Gundan
M (M) : Made
WPN (MEB) : Wezareta Perwerdehiya Neteweyî
LEN (MGK) : Lijneya Ewlehiya Neteweyî
LJTR (RTÜK) :Lijneya Bilind A Televizyon û Radyoyê
BPC (SODES) : Bernameya Pişтevaniya Civakî
TNŞ (ŞNT) : Transfera Neqdê Ya Bi Şert
PMGM (TBMM) : Parlamentoya Mezin Ya Gel Ya Tirkiyeyê
QCT (TCK) : Qanûna Cezayê Ya Tirkiyê
QTDT (TMK) : Qanûna Têkoşîna Li Dijî Terorê
TRT (TRT) : Saziya Televizyon û Radyoyê Ya Tirkiyeyê
ŞEB (YAŞ) : Şûreya Eskerî Ya Bilind
LHB (YÖK) : Lijneya Hîndekarîya Bilind
2002-2012
9
PÊŞGOTIN
Di 10 salên dawîn de me bi hezkirina bê dawî ya gel û welatê xwe ve, di her warên jiyanê de xizmetên gelek mezin, razemeniyên pirr fireh û reformên bi kok pêk anîn. Bê guman di nav xizmetên mezin yên ku me di salên dawîn de ji bo Tirkiyeyê pêk anîye de, cihê reform û pêngavên demokratîk gelek cuda û taybet in. Ew pêngavên ku me ji bo Tirkiye zêdetir bi aram, bi ewle, demokratîk, bi refah û azad be avêtin, rûyê welatê me guherandin. Pêngavên demokratîkbûnê, rasterast bandor li ser aborî, polîtîkaya derve û jiyana civakî ya Tirkiyeyê kir û her wiha welatê me di her warî de hêzdartir û mezintir kir.

Kevneşopiya me ya qedîm û zexm li ser ev rêgeza ku Şêx Edebalî jî bi gotina, “ Mirovan bide jiyandin ku dewlet jî bijî” hatiye avakirin. Dewlet ji bo însanan heye, ji bo xizmeta mirovan heye. Ew dewleta ku qîmetê nede welatîyên xwe, wan nehesibîne, wan veder bike, cudatiyê têxe navbera wan û welatîyan wek gef bibîne û xwe, li hember wan hilde bin parastinê, wê demê nikare tu xizmetekê bike, nikare maf û heqên wan biparêze, nikare dewleta xwe mezin bike û refahê bîne welatê xwe. Dewlet, hêzeke li dijî welatîyên xwe nîn e; binesaziyeke wisa ye ku divê digel gelê xwe hebûna xwe bidomîne, li hember gelê xwe xizmetên stûbariyên xwe bîne cih.

Di 10 salên dawîn de, ji bo ku dewlet bibe xizmetkarê welatîyên xwe, ji bo ku jihevnebaweriya di navbera dewlet û gel de bê safîkirin û ango dewlet û welatî hevdu hembêz bikin, me hewl û xebateke

pir mezin da. Di vê pêvajoyê de, bi fikr û ramana ‘demokrasî û pêşveçûn li deverê dest pê dike’ re, me reforma rêvebirtiyên devertî pêk anî. Bi bernameyên wek KÖYDES, BELDES, Vegera Gundan û Rehabilitasyonê, SODESê û pêkanîna zirarên mexdûrên terorê, me di qadên civakî û aborî de pêngavên gelek girîng avêtin. Me, bi teşwîq û alîkariyan jî ferqa pêşveçûnê ya di navbera herêman de bi awayekî berbiçav kêm kir û refah gihîşte heta cih û warên biçûk û yên dûr jî. Di vê pêvajoyê de digel pêngavên pêşveçûn û pêşvebirinê, di têkoşîna li dijî terorê, demokratîkbûnê û qadên rêkûpêkkirina hiqûqê de jî me pêngavên mezin yên wek ‘Şoreşa Bêdeng’ tên binavkirin avêtin. Lê me ne ji demokrasîyê ne ji ewlehiyê ne jî ji azadiyan tawîz neda. Ji bo ku aştiya civakî pêk were, me nêrîneke jiberkirinê ji holê radike wek bingeh girt û “paradigmayeke ewlehiyê” ya nû damezrand. Me rewşa

awarte rakir. Ji aliyê din Dadgehên Ewlehiya Dewletê û Dadgehên Xwedî Rayeya Taybet jî hatin rakirin. Me Misteşariya Ewlehî û Pergala Gel saz kir. Ya herî girîng jî bi destpêkirina pêngava ji bo aştiya civakî ku em jê rê dibêjin 'Pêvajoya Biratî û Yekîtiya Neteweyî', me şoreşeke bîrûbaweriyê pêk anî.

Me bi vê şoreşê, şûna nêrîna dewletparêz ya ku welatîyên xwe wek tehdît didît, nêrîna ku cudahiyan wek dewlemendî dibîne û ji bo welatîyan xizmetkirinê wek peywir qebûl dike xiste merîyetê. Me di her astê de derfeta hînbûna ziman û zaravayên cuda û di ziman û zaravayên cuda de derfeta propagandaya siyasî û weşanê jî anî. Ji bo ku girtî û hikumxwarên di girtîgehan de bi xizmên xwe re bi zimanên dayikê biaxivin û hevdîtinan bikin derfet hate dayîn. Ji bo ku hemwelatîyên me ji xizmetên gelemperî bêtir sûdwerbigrin, me di ziman û zaravayên cuda de wergêr îstihdam kirin.

Di qada parastin û pêşvebirina mafên mirovan de me pîvanên merîyetî yên li cihanê wek bingeh girt û li gor vê serastkirin pêk anî. Di vê çerçoveyê de me polîtikaya 'ji îşkenceyê re sifir tolerans' meşand. Li gor biryarên Dadgeha Mafên Mirovan ya Yekîtiya Ewropayê me rêya jinûve darizînê vekir. Me mafê wergirtina destxistina agahiyê jî

anî. Azadiya birêxistinbûnê me firehtir kir. Xebat û kirinên partiyên siyasî me girt bin ewlehiyê. Me Saziya Venêrîna Gel û Saziya Mafên Mirovan ya Tirkiyeyê ava kir.

Me di pêgeha reformên gelemperî û qada darazê de, verastkirinên pir girîng pêkanîn. Nêrîna wesayetparêz ya ku di darazê de serdest bû, ji aliyê me ve ji holê hate rakirin û li şûna wê, bingeheke zêdetir sivîl, zêdetir azadîparêz hat avakirin. Me şûna rêgeza hiqûqa hêzdaran,

rêgeza hêza hiqûqê bi cih kir. Binesaziya Dadgeha Makezagonê û Lijneya Bilind ya Dadger û Dozgeran hat guherandin û binesaziya van saziyan veguherî şiklekî demokratîktir. Li cem darizîneke dadmend û bilez, me mafê serlêdana şexsî ji Dadhega Makezgonê re jî pêk anî. Li ser binyata madeyên wesayetparêz yên Makezagona 1982yî yên ku berhemên destwerdanê ne (mudaxale), me guherînên girîng pêk anî û bi piştgirîya gelê xwe ve standardên demokrasîyê bilindtir kir.
Ji aliyê din, guherîna binesaziya Lijneya Ewlehiya Neteweyî (MGK), tengkirina qada rayeya daraza eskerî, rakirina protokola EMASYA (Ewlehî-Asayîş-Alîkarî) yê, di hin sazî û dezgehan de bidawîkirina endamtiya eskeran, li hember biryarên Şûreya Bilind Ya Eskerî (YAŞ) vekirina rêya darazê, vekirina rêya darizandina derbekarên 12ê Îlonê, di bin banê TBMMyê (Meclîsa Mezin Ya Gel Ya Tirkiyeyê) de avakirina komîsyonên lêkolînê û hin reformên ku me li qadên sivîlbûnê avêtin cih digrin.
Bi saya van reformên mezin, pêngavên sivîlbûn û demokratîkbûnê, me Tirkiyeyeke bêtir hêzdar, bêtir dewlemend, bêtir avabûyî, bêtir demokratîk û bêtir azad ava kir. Ji bo ku Tirkiye bigihîje hedefên xwe yên 2023an, ji bo ku li herêma xwe û li dinyayê hêzdartir bibe û giramiya wê zêde bibe û ji bo ‘Jinûve Tirkiyeyeke Nûjen û Mezin’ em ê reformên xwe bi awayekî biryardar bidomînin. Ez bawer dikim ku, Tirkiye çiqas li pişt van reforman bisekine û ji bo guherîin û pêşveçûnê reforman pêk bîne, li herêma xwe dê bibe aktoreke girîng û bi saya aboriya xwe ya mezin, bi demokrasîya xwe ya pêşveçûyî û polîtîkaya xwe ya çalak ya derve ve, li dinyayê Şoreşa Bêdeng
12
mîna stêrkeke ku her diçe bilind dibe dê bigihîje asteke hêj

bilindtir.
Ev pirtûka di destê we de ye, reformên gelemperî yên mezin yên ku di navbera sala 2002-2012an de me wek ‘Şoreşên Bêdeng’ pêkanîne dihewîne. Ez bawer dikim ku ev xebata girîng ya ku ji bo pêvajoya reformên pêşerojê tê kirin ji vir şûnde jî wek nexşerêyekê, ji nifşên pêşerojê re dê bibe çavkanî û referanseke girîng. Bi vê wesîleyê, ji hemû sazî û kesên ku di amadekirin û sepandina reforman de keda wan heye re, bi dil û can spas dikim. Dîsa ji hemû sazî û kesên ku ev pirtûkokê amadekirine re jî spas dikim û wan pîroz dikim.
Bi hêvîya ku em ê ji nifşên pêşerojê re Tirkiyeyeke hêj hêzdartir û dewlemendtir emanet bikin…
Recep Tayyip ERDOĞAN
Serokwezîr
2002-2012
13
PÊŞKÊŞ
Heyama 2002-2012an li Tirkiyeyê ji bo hêzdarkirina demokrasî û mafên mirovan demeke pir taybet û girîng e. A rastî jî di pêvajoya 10 salên dawîn de, ji bo ku demokrasîya me zexm û rêkûpêk bibe, ji hemû beşan însanên me ji mafên bingehîn û azadiyan bêtir û bi awayekî berfireh sûde werbigirin pêngavên gelek girîng hatin avêtin. Van pêngavan, dûrahiya di navbera dewlet û gel de kurt kirin, bi gotineke din jêbaweriya welatîyan ji dewleta xwe re zêdetir kirin. Ji ber nêrîna ewlehîparêz û saziyên wesayetê, di serî de maf û azadî, hemû dengên daxwazên gelê me yên ku heta niha hatine paşguhkirin, di heyama desthilatdariya AK Partiyê de êdî hatin guhdarîkirin. Di vê çerçoveyê de, me di nav ewlehî û azadiyan de dengeyek ava kir, me qet ferq nexist nav însanên xwe û ji bo ku daxwazên rewa yên hemû

welatîyên xwe bi awayekî berfireh bînin cih me, hewl û xebateke mezin da.
Ev pêngavên ku ji aliyê hikumetên AK Partiyê ve, di vê pêvajoyê de hatin avêtin nîşan didin ku, ji bo gihîştîna Tirkiyeyeke mezintir û hêzdar em ji zivranokeke çiqas dîrokî derbas bûn/dibin. Ji aliyekî ve welatê me li gor standardên demokrasîyê gihîşt kategoriya herî bilind ya dinyayê, ji aliyê din ve jî rêzdariya welatê me him li herêma xwe him jî li cihanê her diçe zêdetir dibe. Ev pêşveçûn û pêngavên baş nîşan didin ku, desthilatiya AK Partiyê di warên nijadî, çandî, olî û sîyasî de cudatiyê naxe navbera welatîyên xwe, hemû welatîyên xwe, wekhev dibîne û hemû însanên xwe, 'welatîyên wekhev û azad' dipejirîne. Di ser de him ji aliyê hikumetên me ve, ji bo demokratîkbûnê seratskirin Şoreşa Bêdeng

hatin kirin him jî ji bo pêçandina birînên berê girîngiyeke mezin hate dayîn.
Ji bo pêvajoya guherîn, veguherîn û pêşveçûnê ya ku di deh salên dawîn de li Tirkiyeyê hatiye meşandin, em dikarin bêjin mîna pêkhatina 'şoreşeke bêdeng' e. Lewra di navbera salên 2002-2012an de reformên ku qadên demokrasî û mafên mirovan firehtir û hêzdartir kirin li pey hev hatin kirin. Bêguman hikumeta me reformên xwe yên di warên demokratîkbûn û azadîbûna siyasî de, wê bênavber û bi heman lezê bidomîne. A rastî ji bo dîyarkirina nexşerêya pêşerojê, divê ew mesafeya ku me di deh salên dawî de li pişt xwe hişt, were dîtin. Ji ber vê sedemê, ji aliyê Misteşariya Ewlehî û Pergala Gel ve, derbarê pêngavên me yên demokratîkbûnê yên di navbera salên 2002-2012an de dihewîne pirtûkek hat amadekirin. Bi vê xebatê hat armanckirin ku menzereya Tirkiyeyê ya ku me di sala 2002yan

de dewr stand, di sala 2012yan de veguherîneke çawa derbas kiriye were dîtin. Ev pirtûk ji aliyekî ve reformên ku berê hatine kirin yek û yek vedibêje ji aliyê din ve jî wek rehbereke ku îdealên azadibûn û demokratîkbûnê yên desthilata me nîşan dide.

Gelo çima hewce bû ku pirtûkeke wiha were amadekirin? Wek tê zanîn ku însan tiştan zû ji bîr dikin. Mixabin nifşên nû derbarê heyamên berê de pir agahdar nînin û agahîgirtina ji heyamên berê ji ber van tiştan gelekî dijwar e. Bi rastî dema mirov niha li vê xebata di destê we de binihêre, wê demê baş fahm dike ku, li gor 10 salên dawî em li Tirkiyeyeke çiqas cuda de dijîn. Lewra ev xebat ewqas bandordare ku yên ku vê heyamê nejiyane jî, dê vê ferqa girîng bibînin. Vaye ev pirtûk jî ji bo vê sedemê hatiye amadekirin. Em neheqiyê li Tirkiyeyê û li xwe nekin. Tirkiye di rêwîtiya demokratîkbûnê û mafên mirovan de pir mesafe stand û pêşve çû. Jixwe mîsyona bingehîn ya hikumetên AK Partiyê ev bû û hêj jî ev e. Rêwîtiya me ya ku hetta Tirkiye bibe welatê azadiyan û edaletê dê bidome.

Ez wek kesekî ku di heyamên berê yên Tirkiyeyê de jî jiyame û sedema amadekirina van xebatan dizanim, dikarim bêjim ku, ez vê

xebatê bandordar û pir girîng dibînim. Bi hêviya ku bi navbeynkariya pirtûka ‘Şoreşa Bêdeng’, rêwîtiya Tirkiyeyê ya di deh salên dawî de ya warên demokratîkbûnê, him li nav welêt û him jî li qada navneteweyî baş were fahm kirin, ez jî ji kesên ku keda wan ketiye nav vê xebatê re spas dikim.

Beşir ATALAY
Alîkarê Serokwezîr
2002-2012

17

TEQDÎM

Ji heyama destpêkirina jiyana siyasî ya pirpartîtiyê heta salên 2000an, ji bo ku demokrasîya me pirsgirêkên xwe çareser bike, têkoşîneke xurt hate dayîn. Lê belê pêvajoya demokratîkbûna welatê me ji ber destwerdanên derasayî hin caran rawestiya ye. Tevî pêngavên ji bo pêşveçûnê û hewlên hatine dayîn, gelek salan demokrasîya me negihîşt asta standarda navneteweyî. Ji ber vê di navbera dewlet û gel de têkilî qetiya û ji hev dûr bûn, deshilatiyên ku hatin ser kar jî, daxwazên veguherînê yên gel bi rêkûpek bi cih neanîn.

Derbarê çareserkirina pirsgirêkên ku di jiyana civakî û siyasî de bi awayekî zelal dîyar bibûn, di deh salên dawî de, di dîroka Komarê de xebat û tevgereke berfireh û bi pêgeh ya demokratîkbûnê hate kirin. Sedema van pêngavên ku di deh salên dawîn de hatin avêtin ew e ku, sîstema rêvebirtiya ku bi hinek hêz û olîgarşiya bîrokratîk dihat birêvebirin were tasfiyekirin û pergaleke demokratik ya vîna gel serdest e bikeve şûna wê. Di vê çerçoveyê de bi saya pergala rêvebirtiyê ya ku ewil însanan difikire, ji bo ku maf û azadiyên bingehîn di her warî de pêşve biçe û derkeve asta pîvanên navneteweyî reform hatin kirin. Ji aliyê gelek çavdêrên xwemalî û biyanî ve jî tê qebûlkirin ku bi saya reformên ‘Şoreşa Bêdeng’ gelek pêşveçûn û başbûn pêk hatin. Di van heyamên ku hatin destnîşankirin de polîtîkayên ku însanan wek navend digire û têkiliyên qutbûyî yên di navbera dewlet û civakê de dê çareser bike hatin meşandin. Nekirina cudatiyê û bi hişmediya welatîbûna wekhev, ji bo ku însanên me ji maf û azadiyên bingehîn Şoreşa Bêdeng

18

bi awayekî herî berfireh sûdê bistînin verastkirinên girîng ketin

merîyetê. Hesasiyetên hêlên cuda yên civakê li ber çav hatin girtin û mexdûrîyetên wan ji holê hatin rakirin. Ji kesên ku bûne sedema van mexdûrîyetan hesab hat pirsîn.
Bêguman firehkirin û pêşvebirina demokratîkbûnê û azadiyên şexsî, rêwîtiyeke wisa ye ku tu carî bi dawî nabe. Her wiha dewletên ku tê gotin pêşveçûne jî di warên demokrasî û mafên mirovan de rastî gelek pirsgirêkan tên. Lê tişta girîng ev e ku divê sîstem, demokrasîye bi sazî bike, maf û azadiyên bingehîn bigire bin ewlehiyê û bi mekanîzmayên wisa xwe dorpêç bike ku rêya kesên ku serî li rêbazên derqanûnî didin jî bigire. Tirkiye di deh salên dawîn de xwe ji gelek xeletî û kirinên nebaş yên heyamên berê paqij kir, divê hewlên avakirina demokrasîyeke ku bibe çanda jiyanê û bi sazî bibe bidomîne.
Ev envantera di destê we de wek kurtasiya sepandinên ku di deh salên dawî de ji bo demokratîkbûna welêt û hêzdarkirina maf û azadiyên bingehîn yên ketine merîyetê dihewîne. Bi saya vê pirtûkê raya gişti ya nav welêt û derwelêt derfeta şopandina reformên demokratîkbûnê yên Tirkiyeyê yên di deh salên dawîn de ku hatin avêtin dikarin ji çavkaniya sereke bi dest bixin. Ez, ji pewirdarên Misteşariyê û yên ku bi keda wan ev pirtûk hatiye amadekirin re spas dikim. Hêvîdarim ku kesên bi van mijaran re mijûl û eqedar in jî ji vê pirtûkê sûdê werbigirin.
Ulvi SARAN
Walî
Misteşarê Ewlehiyê û Pergala Gel
Envantera Guherîn û Veguherîna
Demokratîk Ya Tirkiyê Yê
2002-2012
ŞOREŞA BÊDENG

2002-2012

21

DESTPÊK

Di dawiya sedsala 19emîn de êdî çaxên împaratoriyan qediyan û bi destpêka sedsala 20emîn dinyaya me, ber bi modela takekesî, civakî, dewletî û ya piyaseyeke nû ve diçû. Di vê modela nû de, dewlet ji hev bêtir dûr, civak ji hev bêtir bê hay, piyase jî bi hev re bêtir bê pêwendî bûn, şexis jî hêj tam li holê nedixuya. Lê em di sedsala 21emîn de, ber bi çaxeke pir cuda ; ber bi dinyayeke ku têkiliyên şexs, civak û dewletan gelek cuda tê pêşxistin ve diçin. Di bin bandorên pêvajoyên gerdûnîbûnê, amûrên ragîhandinên civakî, teknolojîyên ragîhandin û agahîdana înformatîk de, êdî wekî berê ne gengaze ku civak, dewlet û komên girtî rewşên xwe yên berê bidomînin. Di heyama îroyîn ya ku desthilatiya dewleta klasîk wateya xwe ya berê winda kiriye û êdî şexs, civak û piyase bêtir nêzî hevdu bûne de, domandina sepandinên ku li dijî azadiyê, mafên mirovan û demokrasîyê ne, her diçe dijwar dibe. Bi awayekî zelal dixuyê ku ev hemû rûdanên ku li dinyayê pêk tên, ji gelek hêlan ve welatê me jî digire bin bandora xwe. Tirkiye xwe ji rûdanan dûr negirtiye, her çiqas piştî bûyera 11ê Îlonê (Ya li Amerîkayê pêk hat) li giştiyê dinyayê sepandinên ewlehiyê derketibin pêş jî, di navbera salên 2002-2012an de Tirkiye pêvajoya demokratîkbûnê ya ku di dîroka Komarê de pêvajoyeke herî berfirehe pêkanî.

Wek tê zanîn pirsgirêka herî girîng ya ku welatê me pêk hat ew bû ku, di navbera welatî û dewletê de mesafeyek hebû, ji ber sepandin û polîtîkayên nerast jî ev mesafe her çû zêdetir bû. Sedema vê yekê jî, ev bû ku ji bo çareserkirina pirsgirêkên siyasî û civakî, paradigmaya

Şoreşa Bêdeng

22

ewlehîparêz hatibû tercîh kirin. Bi salan e daxwazên welatîyan yên ku ji bo firehkirina qadên demokrasî, azadî û mafan nehatibû bihîstîn û dîtin, di ser de jî bilêvkirina van daxwazan hatibû astengkirin.
Di dawiyê de bi serpêhatiyên gelek bi êş û bi jan derketin holê ku sepandina polîtîkayên ewlehîparêz û xwe ji gel dûr digire pirsgirêkên welat çareser nakin, berovajî her diçe van pirsgirêkan mezin dike.
Ji bo ku standardên demokrasîyê werin bilindkirin di dîroka me ya nêz de reformên girîng pêk hatin. Piştre dema ku welatê me derbasî jiyana siyasî ya bi pirpartiyî bû, di serî de di heyamên Adnan Menderes û Turgut Özal de, di warên demokratîkbûn û sivîlbûnê de pêngavên gelek girîng hatin avêtin. Dema ku em li dîroka xwe ya nêz dinhêrin, dibînin ku reformên di navbera salên 1999-2001an de di çerçoveya pêvajoya ahengîbûna bi Yekîtiya Ewropayê re de di warên mafên bingehîn de nûgerî pêk dihatin ku ev gelek girîng in. Lê belê dema ku zêdebûn, pêgeh, wesf û bandora wan reforman were berçavkirin, wî çaxî dê were pejirandin ku reformên heyama salên 2002-2012an xwedî girîngiyeke taybet in. Di vê heyamê de, bi sernavê «demokratîkbûnê», di warên sivîlbûn, asayîbûn, bilindkirina standardên dewleta hiqûqê û mafên mirovan de reformên dîrokî pêk hatin.
Di vê heyama ku pêvajoyên sivîlbûn û demokratîkbûnê yên herî berfireh yên ku di dîroka Komara Tirkiyeyê da hatiye jiyîn de, astengên li ser jiyana rojane yên ku bi rêyên eskerî û bîrokrasiyê dihatin pêkanîn, yek û yek hatin rakirin. Her wiha bi rakirina van astengên hişk, hat armanckirin ku jiyan ji her alîyê ve bigihîje rewşeke asayî û hewla me ya ji bo asayîbûnê jî bi biryardarî hat domandin. Bandora neyînî ya bîrokrasiya gelemperî ku li paş rûdan û pêşketinên li civaka xwe û dinyayê mabû û ji ber vê paşmayinê jî li ber guherînan wek asteng disekinî hat kêmkirin.

Pêngavên demokratîkbûnê bi taybetiya xwe ya Tirkiyeyê, mohra xwe li deh salên ewil yên sedsala 21emîn xist û digel vê mijara niqaşê ya pêşerojê jî dîyar kir. Ev nîqaşên ku piştî sala 2009an bi pêvajoya 'Projeya Biratî û Yekîtiya Neteweyî' gur bûn, bi rastî him demokratîkbûn û

sivîlbûna dewletê bileztir kir û bingeha saziya siyasetê jî hêzdartir kir. Ev serastkirinên ku ketin merîyetê û rakirina astengên di navbera dewlet û gel de armanc dike; kêmkirina bandora dewletê û firehkirina qadên civakî hedef digire û dixwaze însanan derxe pêş. Bi saya van serastkirinên ku di serî de Kurd, Alewî, Roman û xeyrî mûslim beşên cuda yên civakê eleqedar dikin re raya giştî jî bi pirsgirêkên wan beşan re rûbirû bû û derfet pêk hat ku bi awayekî serbest pirsgirêk werin nîqaş kirin û lêgerînên çareseriyê lezgîntir bûn. Cudahiyên olî, çandî û etnikî yên ku dewlemendiya gelê me nîşan didin, di salên 1990an de ne pêkan bû ku bihatina bilêv kirin, lê di dawiya vê heyamê de rewşeke wisa derket holê ku ev tişt êdî di qadeke gelek dînamîk û azad de hatin nîqaş kirin. Tirkiye di heyamek wiha de pirsgirêkên xwe bi awayekî eşkere û zelal axivî, nîqaş kir û hewlên xwe yên ji bo demokratîkbûnê lezgîntir kirin.

Ev pêngavên ku qada maf û azadiyên bingehîn fireh kirin, jiyana

rojane ya însanan hêsantir kirin û jêbaweriya ji dewletê xurt kirin ku ne tenê ji bo beşeke civakê bi ramankirina temamê civakê hatin avêtin. Ji van sepandinên ku ketin merîyetê hemû beşên ku di bin astengîyan de bûn sûd wergirtin. Digel pêngavên ku azadî û demokrasîyê xurtir kirin, feeliyetên terorê û daxwazên rewa ji hev hatin veqetandin û bi awayekî baldartir û bi berpirsiyarî nêzîkbûna gel hat pêkanîn. Mexdûriyetên ku ji sepandinên heyamên berê çêbibûn ji holê hatin rakirin. Her wiha Tirkiye, ji bo hemû welatîyên xwe bû welatekî azad, bi ewle, bi refah û bi aram. 'Polîtikayên Demokratîkbûnê' yên ku demeke dirêj hatibûn nîqaşkirin, encax di salên 2000an de şênber bûn, li aliyekî civakê bi pirsgirêkan re rû bi rû kir, li aliyekî

Ev pêngavên ku qada maf û
azadiyên bingehîn fireh kirin,
jiyana rojane ya însanan hêsantir
kirin û jêbaweriya ji dewletê
xurt kirin ku ne tenê ji bo beşeke
civakê bi ramankirina temamê
civakê hatin avêtin.

Şoreşa Bêdeng
24

jî «restorasyoneke wek civakî» pêk anî. Dema mirov li pêngavên ku di deh salên dawî de hatine avêtin yên Tirkiyeya ku dixwaze bigihîje bilindahiya pêlên guherînên li dinyayê pêk tên binhêre, mirov dikare van pêngavên hatine avêtin wek «Şoreşeke Bêdeng» bi nav bike. Armanca amadekirina vê pirtûkê ev e ku envantera pêngavên guherîn û veguherînên ji bo demokratîkbûnê yên di navbera salên 2002-2012an da pêk hatin, derxe holê. Bi vê envanterê ve guherîna dewletê ya di nav deh salên dawî de pêk hatiye wê hêj baştir were

dîtin. Pêngavên ku hatine avêtin jî dê bi aweyekî baş û rast bigihêje nifşên pêşerojê. Ji aliyê din ve, bi rengekî eşkere ji bo ji pêşerojê re nexşerêyek rasteqîn û rast were dîyarkirin envanterek berfireh ya wekî vê pirtûkê hewce ye. Lewra ji bo ku pêngavên hatine avêtin û reformên hatine kirin berdewam bin û ber bi hedefên rast ve biçin, divê dîrok û ev heyam baş û rast were zanîn. Her wiha bi vî awayî, civakên giştî yên neteweyî û navneteweyî yên ku dixwazin derbarê reforman de agahdar bibin, dê bigihîjin van agahiyan. Ango ev envanter ji bo kesên ku ji reformên deh salên dawî hatine kirin eleqedarin re jî dê bibe referanseke cidî.

Ev envanter hemû xebatên di deh salên dawî de hatine kirin nahewîne. Bi tenê pêngavên ku di warên demokratîkbûn û mafên mirovan de hatine avêtin û xebatên din yên serekeyî yên ji bo avêtina van pêngavan hêsantî pêk anîne dihewîne.

Di beşa yekemîn ya pirtûkê de ji bo ku mesafeya rêwîtiya demokrasîya Tirkiyeyê ya di deh salên dawî de pêk hat baş were nîşankirin û bi vî awayî pêvajo hêj rast were nirxandin, pêngavên ku hatin avêtin bi awayekî giştî hatin vegotin. Di beşa yekem de ne kronolojî, vegotineke li gor mijaran hat tercîh kirin.

Di beşa duyemîn de jî bi awayekî berfireh pêngavên ku hatin avêtin li gor kronolojiyê bi vegotineke hurgilî cih digirin. Ji bo vê armancê di qada demokratîkbûnê de sepandin û verastkirinên ku bandordar in li gor dîrokên wan hatin rêz kirin, her wiha envantera deh salên 2002-2012

dawî ya demokratîkbûnê hat amadekirin. Pêngavên demokratîkbûnê yên sala 2013an jî, ji ber girîngiya wê, bi vê beşa ku bi taybetî heyama 2002-2012an dihewîne re hat tevkirin.

Lê belê demokratîkbûn, pêvajoyeke wisa ye ku bi piralî û pirdemî didome û tu carî bi dawî nabe, ji aliyê din ve gelek rêje û hêzên azadî û mafên mirovan bilind dikin jî di nav xwe de dihewîne. Her wiha li hember şertên Tirkiyeyê û dinyayê yên ku bilez diguherin, tiştên ku werin kirin bê guman bi tenê bi navkirinan re ne bi sînor in.
Heke ev pirtûk ji bo xebatên ku armanc dikin bi hemû hêlan ve pêngavên demokratîkbûnê yên li ser azadî, ewlehî, eskerî, çandî, hiqûqî, siyasî û civakî yên deh salên dawî de hatine avêtin analîzan bikin û ji aliyê lêkolînerên biyanî û xwemalî, pîspor, mirovên akademîk û saziyên raman û lêkolînan ve werin amadekirin re wek «pirtûkeke referans» jêderiyê bike, wî çaxî em dikarin bêjin ku gihîştiye armanca xwe.
2002-2012
27
BEŞA YEKEMÎN
PÊVAJOYÊN
DEMOKRATÎKBÛNÊ YÊN
HEYAMA 2002-2012an
SERPÊHATÎYÊN DEMOKRASÎ Û
MAFÊN MIROVAN YÊN HEYAMÊN
NÊZ YÊN TIRKIYE YÊ
2002-2012
31
SERPÊHATÎYÊN DEMOKRASÎ Û MAFÊN
MIROVAN YÊN HEYAMÊN NÊZ YÊN TIRKIYE YÊ
Makezagonên 1961 û 1982an
Li Tirkiyeyê derbasbûna demokrasîyê digel heyama jiyana siyasî ya bi pirpartîtiyê pêk hat. Wek tê zanîn rûdanên li qada navnetewiyê yên ku piştî 2. Şerê Cîhanê hatin jiyîn, ji bo Tirkiyeyê jî derbasbûna

jiyaneke pirpartîtiyê bûn sedemên gelek girîng. Lê belê li welatê me pergala demokratîk ya ku pştî jiyana pirpartîtiyê derket holê, ewqas dirêj dewam nekir, bi derbeya eskerî hat astengkirin. Pştî derbeyê dewlet, jinûve hat pevxistin û binesazîkirin. Ji aliyekî ve di bîrokrasiya eskerî/ sivîl de û li zanîngehan bi pêgehên berfireh dûrxistin hatin pêkanîn, ji aliyê din ve jî bi Makezagonek nû bi awayekî baldarî li gor vê pêvxistina nû, binesaziya dewletê hat avakirin.
Makezagonên 1961 û 1982an yên ku pştî derbasbûna jiyana siyasî ya bi pirpartîtiyê hatibûn qebûl kirin, her çiqas cih dabe rêgezên Komarê yên wek “mafên mirovan”, “dewleta hiqûqê”, “dewleta demokratîk” jî sepandineke li gor nêrîna xwe pejirandibûn. Ji ber van sedemên jêderiya van herdu makezagonan pêk dihatin, pirsgirêkên girîng yên ji mafên mirovan, demokrasî û dewleta hiqûqê re çewt (nakokî) diketin, derketin holê.
Di Makezagona 1961ê de cara ewil li cem wesfên Komarê cih dan rêgezên dewleteke hiqûqa civakî, laîk, demokratîk, li gor mafê mirovan û li gor hewcehiya van rêgezan ji lijne û saziyan re jî cih

hat dayîn. Pştî 1961ê ji bo ku venêrîna darazî pêk were Dadgeha Makezagonê û Şûreya Dewletê hatiye Damezirandin, ji bo pêkanîna darazê jî Lijneya Bilind ya Dadgeran û Lijneya Bilind ya Dozgeran hatiye pêşbînîkirin. Lê belê ev nûtiyên pêk hatin û bi nêrîna ewil erênî dixuyîn, di sepandina xwe de di serî de mînaka Dadgeha Makezagonê encamên cuda derxistin holê. Lewra Dadgeha Makezagonê ji roja ku dest bi peywira xwe kir ji cihê tevgera li gor demokrasî û mafên mirovan, nêrîneke parastina dewletê pêş xist; biryarên ku li ser xebitîn û binesaziya jiyana siyasî dan jî her tim bûn mijara nîqaşê.

Tê dîtin ku ev nêrîn û tevgerên bi pirsgirêk, di Makezagona 1982yan de jî berdewam kir. Di vê noqtê de ferqa herî girîng Makezagona 1982yan ji Makezagona 1961ê ew e ku, tercîha dewletparêz/ wesayetparêz ne bi awayekî veşartî bi rengekî eşkere hatiye bilêvkirin. Lewra him di destpêkê him jî amadekirina madeyan ya Makezagona 1982yan de, dewlet û pîrozbûna dewletê bi şiklekî eşkere li pêşiya mafên mirovan cih girtiye.

Pirsgirêka Wesayetê

Dema ku li Tirkiyeyê li rûdanên ku piştî derbasbûna demokrasîyê pêk hatin û xebitînên rejima demokratîk binihêrin, taybetmendiyek girîng dê were dîtin: “wesayet”. Rastiya wesayatê, him di mûhtira û derbeyên eskerî de him jî di xebitînên Makezagonên 1961 û 1982yan de xwe nîşan dide. Bi derbeyên eskerî yên 27ê Gulana sala 1960 û 12ê Îlona sala 1980yî daxistina desthilatdariyên ku bi hilbijartinê hatibûn ser kar û bi mûhtirayên 12ê Adara sala 1971 û 28ê Sibata sala 1997 yên ku di hedefa wan de dîsa desthilatdarî hebûn, nîşan didin ku aktorên wesayetê çiqas bihêz in. Wesayetparêz bi saya vê hêza xwe, li hember aktorên siyasî binesazîyeke makezagonî ya ku cihê wan hêj xurtir dikir, pêk anîbûn. Di mijara wesayetê de saziya herî girîng jî MGK (Lijneya Ewlehiya Netewî) bû. MGK ya ku bi Makezagona 1961ê wek saziyeke fermî hat damezrandin, di mijarên ewlehiya neteweyî de ji bo alîkariya îktîdaran hatibû avakirin. Lê belê ji ber ku endamên MGKê piranî esker bûn, biryarên ku di MGKê de dihatin

girtin, êdî ji desthilatiyên siyasî re ne wek pêşniyar, wek biryarên ku vîna desthilatdariya siyasî girêdida dihatin dîtin. Ji aliyê din ve, ji ber ku têgihîştina ewlehiya netewî bi awayek berfireh hatibû nasandin,

ekseran destwerdana rayeya desthilatiyên siyasî jî dikirin.
Li Tirkiyeyê di mijara wesayetê de, divê ji bilî hêzên çekdar erk û aktorên bîrokratîk jî neyên jibîr kirin. Di nav aktorên wesayetê de daraz girîngiyeke taybet digire. Lewra ji ber ku biryarên darazê ji bo erkên din hukmê lêgirêdanê bû û ev biryar di bin venêrînek din de jî nebû, daraz xwedî cihek cuda bû. Di dewleteke hiqûqê de lêgirêdanbûna biryarên darazê, ji ber ku daraz hiqûqê bingeh digire û bi vî awayî biryaran dide tê qebûlkirin. Lê heke daraz, ji sînorê hiqûqê derbas bibe û biryaran bide û piştre jî ev biryar di hukmê lêgirêdanbûnê de bibe, di rewşeke wiha de jî xebitîna rejîmê êdî derdikeve der rêgeza dewleta hiqûqê. Li Tirkiyeyê dezgehên daraza bilind, di hin biryarên Dadgeha Makezagonê û Şûreya Dewletê de hêj eşkere tê dîtin ku, bi gelek mînakan ve derdikeve holê ku li gor sîstema wesayetparêz tevgeriyane û biryarên xwe dane.
Dewleta Hiqûqê û Daraz
Bingeha rêgezên dewleta hiqûqê ev e ku hemû kes û saziyên ku hêza gelemperî bikar tînin girêdayî hiqûqê bin. Di dewleta hiqûqê de zagonsazî û birêvebirin encax dikarin di nav sînorên hiqûqê de rayeya xwe bikar bînin. Ev saziyên dewletê heke li der hiqûqê tevbigerin, wê demê venêrîna darazê wek mekanîzmeyeke bi mecbûr dikeve dewrê. Ji ber vê sedemê di dewleteke hiqûqê de venêrîna darazê û erkê darazê di nav pergala siyasî de xwedî ciîhek taybet in. Daraz ji ber wesfa xwe divê li gor bingehgirtina rêgezên mafên mirovan û hiqûqê biryaran bide. Lê di venêrînên pêk bîne de qaîdeyên ku li ser disekine jî, ne pêkane ku her dem bi awayekî zelal vekirîbe. Di rewşên wiha de divê daraz, di şîroveyên xwe de li gor rêgezên hiqûqê û azadîparêziyê ekî hukmekî pêk bîne. Daraz encax bi tevgereke wiha, li gor xebitîna dewleta hiqûqê dê bigihîje asta xwe.

Tevî van hemû tiştan ne mimkune mirov bikaribe bêje ku di heyama nêz ya Tirkiyeyê de daraz li gor wê xebitînê tevgeriya ye. Lewra di heyamên ku aktorên wesayetparêz hêzdar bûn û nêrîna wesayetparêzî bi bandor bû, daraz ne li gor hiqûq û azadiyan, li gor birêvebirina tevger û îdeolojiya dewletê dikaribû biryaran bide. Ji aliyê din ve, heke rêgezên ku daraz li gor wê tevdigerin ne li gor standardên gerdûnî be, wê demê dibe ku daraz bi biryarên digire ve zirarê bigihîne serdestiya hiqûqê jî. Mijarên din jî gihandina endamên darazê û xwegihandina peywirdarên darazê ye. Ji ber van sedeman ji bo ku li Tirkiyeyê dewleta hiqûqê bikeve merîyetê û wesayeta darazê ji holê were rakirin pirsgirêk û astengîyên girîng di hin raporan de cih digirin. Bi sedema ku daraz, di dewleta hiqûqê de bi awayekî baş peywira xwe nayîne cih, di reformên ku dê werin kirin de daraz xwedî cîhekî girîng e.

Bilindkirina Standardên Demokrasîyê, Jiholêrakirina Wesayetê û Sivîlbûn

Bi destpêka salên 2000an, bi bandorên rûdanên navxweyî, teahûtên Tirkiyeyê yên derbarê hiqûqa navneteweyî de, pêvajoya Yekîtiya Ewropayê (YE) rûdanên herêmî û gerdûnî, hewcehiya guherînên teqez dixist holê. Li Tirkiyeyê bilez mezinbûna sektorên taybet, nifûsa ciwan ya mezin û daxwazên wan jî hewcehiya guherînan pêş xistin. Bi bandora van hemû sedeman, di asta makezagonî û zagonî de hewcehiya bilindkirina standardên demokrasîyê, mafên mirovan û dewleta hiqûqê derket holê. Heke di çerçoveya demokrasîye de lê were nêrîn, hewcehiya guherîna binesaziya hiqûqî ya Makezagona 1982yan pêşbînî dikir, bi awayekî hêsanî dê were dîtin. Lê belê di pergaleke hiqûqî de ji bo ku reformên bingehîn bên kirin hêvîdarbûn têrê nake. Wek tecrûbeyên

dinya û Tirkiyeyê jî nîşan didin, ji bo pêkanîna guherînên wek “pêla demokratîkbûnê” dibe ku were binav kirin, pêwîstiya desthilatiyeke bi biryar û bi hêz heye. Ji aliyê din ji bo ku ev reform pêk bên di heman demê de heyamek bi îstîqrar jî pêwist e. Ji ber vê sedemê hewlên bi hêz yên demokratîkbûnê yên di heyama Makezagona 1982yan de, di heyamên hikumetên bi îstîqrar de hatin kirin.

2002-2012

35

Ji ber ku modela siyasî ya di Makezagona 1982yan de hatibû çerçovekirin pêdivî neanî cîh, ji ber vê sedemê, pêwistbûna reformên makezagonî û zagonî rasterast girêdayê van rûdanan e. Ji sala 1990î vir ve li Tirkiyeyê di warê mafên mirovan de hişmendî her ku çû zêde bû. Ji roja ji aliyê me ve qebûlkirina sêrlêdanên şexsî yên ji ber jêderiya Peymana Mafên Mirovan ya Ewropayê (AİHS) heta îro, ji Tirkiyeyê, ji Dadgeha Mafên Mirovan ya Ewropayê (AİHM) re hejmara serlêdanên şexsî her diçû zêdetir dibû, ji bo kêmkirina van serlêdanên me, di hiqûqa navxweyî ya xwe de qebûlkirina serlêdana şexsî ji Dadgeha Makezagonê re bi vê hişmendiya navborî re rasterast têkîldar e. Tirkiye pêşî (di sala 1987an de) mafê serlêdana şexsî ya di naveroka Peymana Mafên Mirovan ya Ewropayê de qebûlkiribû û paşê jî di sala 1990î de rayeya darizandaina mecbûrî ya Dadgeha Mafên Mirovan ya Ewropayê qêbûl kir. Piştî van qebûlkirinan, biryarên AHİMê yên ku derbarê Tirkiyeyê de bêhtir rojeva welêt mijûl kir. Ji ber ku sepandina biryarên AİHMê mecbûrî bûn û pêvajoya sepandina van biryaran ji aliyê Civata Weziran ya Konseya Ewropayê ve dihat şopandin, ji bo ku biryarên AİHMê li gor girîngiyên xwe bikevin Merîyetê, guherînên makezagonî û zagonî hatin rojevê. Jixwe di guherînên zagonî û reformên ku ji sala 1990î pê ve hatin kirin de,

armanc, bicihanîn û sepandina biryarên Dadgeha Mafên Mirovan ya Ewropayê ye. Bi bandora biryarên AİHMê ve li Tirkiyeyê derbarê mafên mirovan de baldarî û hestiyarî her çû zêde bû û welatîyan ji bo ku li hember dewletê mafên xwe biparêzin, gelek caran serî li saziyên mafên mirovan yên navneteweyî dan.

Di qonaxa destpêkirina pêvajoya demokratîkbûnê de bandora dînamîkên derve bi awayekî eşkere zêdetir e. Di vê qonaxê, kêm bandora dînamîkên naxweyî, li ser pêvajoya demokratîkbûna Tirkiyeyê taybetmendiya xwe jî nîşan dide. Lê digel van tiştan bi reformên hatin kirin û rûdanên siyasî yên ji sala 1990î pê ve pêk hatin, dinamîkên navxweyî jî li ser pêvajoyên demokratîkbûnê bandordar bûn. Ev rewş, êdî di salên 2000an de xwe hêj zelal dide ber çavan.

Şoreşa Bêdeng

36

Di derketina holê ya dînamîkên navxweyî de bandora pêkerên cuda jî henin. Di serî de, aboriya pêşketî û bi taybetî jî Ahengsaziya sektora taybet ya bilez bi rûdanên dinyayê re, û desthilatiyên siyasî mecbûr kirin ku reformên binesazî pêk bînin û wan bixin merîyetê. Bi bilindbûna standardên aboriyê ve, hestiyariya maf û azadiyan yên hin beşên civakî yên cuda zêde bûn. Ji ber zêdebûna hêstiyariya civakî, dezgehên zagonsazî û birêvebirinê gihîştin rewşeke wisa ku êdî hêj zêde li ser daxwazên derbarê mafên mirovan sekinîn.

Ji aliye din ve, bi bandora pêvajoyên gerdûniyê, zêdebûna cureyên amûrên ragihandinê û rûdanên qada teknolojîya ragihandinê, hişt ku mirov him rûdanên li welatê xwe him jî rûdanên qada navnetewî nêzîktir bişopînin û zêdetir bala xwe bidin wan rûdanên derbarê mafên mirovan de pêk dihatin. Bi taybetî kesên ku sepandinên li welatên din dibînin û sepandinên wan û yê Tirkiyeyê didin ber hev,

êdî her tim tiştên herî baş dixwazin û sepandinên xelet yên li welêt bêtir rexne dikin. Ev rewş di mijara rakirina astengên li ber dewleta hiqûqê, demokrasî û mafên mirovan de, desthilatdarî hêj zêde xist nav dijwariyê.

Di vê qonaxê de bi taybetî heyama 2002-2012an, him di warê derketina pirsgirêkan û him jî di warê çareserkirina van pirsgirêkan de ji aliyê pêkanina reformên zagonî ve, heyameke gelek girîng e. Di vê heyamê de desthilatiyên siyasî di qadên demokratîkbûn, sivîlbûn, aborî, polîtîkayên civakî, mafên mirovan, hiqûq û mijarên din de xwestin reforman çêbikin lê belê hêzên statûkoyê li hember reforman sekinîn û astengî derxistin. Ev berxwedana statûkoyê ji ber zêdebûn û belavbûna amûrên ragihandinê, li ber çavên hemû civakê pêk hat. Ji bo pûçkirina vê berxwedana statûkoyê, guherînên Makezagonî yên 2007 û 2010an pêk hatin, bi heman awayî bi pêvajoyeke ku ji aliyê her kesî ve hat şopandin ketin merîyetê.

Di heyama ku hat destnîşan kirin de, li ser berxwedana statukoyê, di makezagonê de du guherînên girîng hatin kirin. Di serî de di sala 2002-2012

37

2007an de digel guherîna Makezagonê ya ku piştî “biryara 367”ê1 ya Dadgeha Makezagonê hate dayîn ve, êdî sepandina ji aliyê gel ve hilbijartina Serokomar ket merîyetê. Wek tê zanîn di Makezagona 1982yan de dihat pêşbînî kirin ku Serokomar aktorekî wesayetê bû; lê bi anîna guherîna zagona ji aliye gel ve hilbijartina Serokomar, êdî di pêvajoyên hilbijartina Serokomar de ku ji sala 1961ê vir de di demên cuda de derdiketin holê zordarî, gef, binpêkirina hiqûqê, qrîz û pirsgirêkên mîna van yên ku dihatin jiyîn jî hatin berteref kirin.

Di warê şikênandina hêza wesayêtê de guherîna Makezagonê ya di

sala 2010an de pêk hat de, bi awayekî giran serastkirinên derbarê wesayeta darazê hebûn. Bi taybetî bi serastkirinên derbarê binesaziya Lijneya Bilind ya Dadger û Dozgeran (HSYK) ve, wesayeta Şûreya Dewletê û Dadgeha Bilind ya ku li ser daraza dadî û îdarî hebû, hat şikênandin. Ji aliye din ve, binesaziya Dadgeha Makezagonê gihîşt rewşeke piranîparêz. Ji bilî van, serastkirinên derbarê daraza eskerî de jî bi awayekî hindik be jî dê ji bo şikênandina hêza wesayetê tevkariyê bide.

Bi du guherînên zagonî yên navborî yên ku ji aliyê rayên gel ve hatin pejirandin, derfet çêbû ku binesaziya wesayetparêz ya ku di Makezagona 1982yan de hatibû pêşbînî kirin, were tesfiyekirin. Piştgirîya gel ya di vê mijarê de nîşan dide ku gel jî dixwaze reformên hewce werin kirin. Digel van rûdanan di serê sala 2000an de li Tirkiyeyê ji jêr ango ji gel daxwazên xurt dihatin û ji bo avêtina pêngavên demokratîkbûnê ne bi tenê dînamîkên ji derve, di heman demê de êdî dînamîkên navxweyî jî bandordar bibûn. Her wiha piştî van rûdanan di hilbijartina giştî ya sala 2011an de di dîroka jiyana siyasî ya Tirkiyeyê de cara yekem li ser daxwaza gel, Meclîsa Gel ya Mezin ya Tirkiyeyê (TBMM) bi vîna xwe ketiye nav pêvajoya çêkirina makezagoneke nû.

1 biryara bi jimara 2007/45 E, 2007/54 K ya bi dîroka 1/5/2007an)

Şoreşa Bêdeng

38

Di Pêvajoyên Demokratîkbûnê De Bandora Yekîtiya Ewropayê

Di qonaxa destpêkirina pêvajoyên demokratîkbûnê de di serî de ya Yekîtiya Ewropayê (YE), bandorên dînamîkên navneteweyî pir girîng bûn. Jiholêrakirina polîtîkayên ji dinyayê dûr, ji gelê xwe ditirse û

newêrek yên di hemû waran de li ser welêt bandordar bûn û di asteke navnetweyî de bicihkirina demokrasîyê û mafên mirovan bandora YE yê û pevajoya Ahengsaziya YE yê bi awayekî eşkere li ber çavan e. Serpêhatiya Tirkiyeyê ya YE yê, di sala 1963yan de bi îmzekirina peymana hevpariyê ya bi Civata Aboriya Ewropayê (AET) re dest pê kir û di sala 1987an de bi serlêdana endamtiya tam ve berdewam kir. Pêvajoya endamtiya YE yê ya ji projeyên ku di hedefa “gihîştina asta şaristaniyên muasir” de projeya herî şênber e, grafîkeke ji rê derketin û ketinê şopand û
hin caran jî gihîşt
noqteya qutbûnê.
Piştî ku di sala
1999an de li Lûtkeya
Helsinkiyê, Tirkiye
wek dewletek namzet
hat qebûl kirin, leza
pêvajoya namzetiya
YE yê zêde bû û di vê
pêvajoyê de pêngavên
ku ji sala 2002yan vir
ve tên avêtin jî cihekî girîng digire. Bi van pêngavên hatin avêtin û reformên hatin kirin yên wê heyamê ve, di sala 2005an de bi YE yê re gotûbêjên (mûzakere) endamtiyê dest pê kirin. Her wiha di pêvajoya ku di sala 1963yan de dest pê kiribû de em gihîştin qonaxeke girîng; lewra Tirkiye ji statûya ‘ji YE yê re dewletek namzet’, derket statûya dewleta ku bi ‘YE yê re gotûbêjên beşdarbûnê dimeşîne’. Krîterên Kopenhagê ku bi armanca entamtiya YE yê dê bihata bicihanîn, ji bo bilindbûna standardên demokrasîyê ya Tirkiyeyê pir

Jiholêrakirina polîtîkayên ji
dinyayê dûr, ji gelê xwe ditirse û
newêrek yên di hemû waran de
li ser welêt bandordar bûn û di
asteke navnetweyî de bicihkirina
demokrasîyê û mafên mirovan
bandora YE yê û pevajoya
Ahengsaziya YE yê bi awayekî
eşkere li ber çavan e.
2002-2012
39
sûdewar bû. Ji sê Krîterên Kopenhagê yên bi sernavên “bilindkirina standardên mafên mirovan”, “demokrasîya sivîl” û “aboriya piyasaya serbest”, ji bo pêvajoya demokratîkbûnê ya Tirkiyeyê sernavên wisa girîng in ku em dikarin bêjin ku bê van, pêvajoya demokrasîyê nikaribû pêşve biçe.

Di çerçoveya pêvajoya ahengiya bi YE yê re di salên 2004 û 2010an de di makezagonê de bi awayekî berfireh guherîn hatin kirin û ji sê paran du parên Makezagona 1982yan hatin guhertin. Bi vê guhertinê re di mijarên girîng yên wekî demokrasî, serdestiya hiqûqê, parastin û pêşvebirina mafên mirovan de rêyek girîng hate pîvan. Bi van guhertinên ku di çerçoveya pakêtên Ahengsaziya Yekîtiya Ewropayê de ketin merîyetê, him demokrasî û dewleta hiqûqê hêzdartir bû û him jî Tirkiye gihîşt qadeke azadtir. Ji aliyê hemû hêlên civakê ve xwedîlêderketina guherînan nîşan dide ku, avêtina van pêngavan ne bi tenê li ser daxwaza YE yê hatiye kirin, di heman demê de li gor daxwaz û xwestekên civakî jî pêk hatine.

GUHERTINA PARADÎGMAYA

EWLEHIYÊ
2002-2012
43
GUHERTINA PARADÎGMAYA EWLEHIYÊ
Piştî hilweşandina Dîwarê Berlînê û bidawîbûna Şer ê Sar, di asta gerdûnî de leza lêgerînê ya “cîhanek zêdetir demokratîk û zêdetir azad” hêrçû zêdetir bû. Ev bayên demokrasî û azadiyê heta Êrîşên 11ê Îlonê yên ku li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê pêk hatin dewam kir.
Li cîhanê di salên 1990an de bayên demokrasî û azadiyê bilind bibû lê di heman heyamê de mirov nikare bêje ku li Tirkiyeyê jî rewş wiha bû. Berovajî dinyayê di wê heyamê de li welatê me, Tirkiyê berê xwe ji dinyayê fetilandibû, rewşa awarte hatibû îlan kirin û rewşên derasayî yên wek bûyerên zordestî û îşkenceyê û kuştinên kiryar nedîyar pêk dihatin. Dîsa di wê heyamê de bi pêvajoya 28ê Sibatê2
, Tirkiye him
ji pêvajoya Yekîtiya Ewropayê û rûdanên dinyayê qetiya, him jî bi welatîyên xwe re ket nav “qeyrana ewlehiyê”.
Piştî bûyera 11 Îlona 2001ê li dinyayê di qada azadiyan de tengkirin û paşveçûn çêbûn lê berovajî dinyayê, li Tirkiyê pêvajoyek erênî xwe nîşan da û di qada demokrasî û mafên mirovan de heyameke firehtir û rihetir hat jiyîn. Bi polîtîkayên ku di deh salên dawî de hatin kirin ve, di feraseta ewlehî ya heyî de guherîna paradîgmayê pêk hat. Polîtîkayên 2 Pêvajoya 28ê Sibatê, destpêkirina pêvajoya antîdemokratîk û bûyerên wê demê ku
piştî biryarên civîna Lijneya Ewlehiya Netewî ya di sala 1997an de hatibû kirin dihundirîne.
Bi vê destwerdana li hember siyasetê ya ku wek “derbeya post modern”

tê binavkirin, zordestî li ser hikumetê hat kirin ku îstîfayê bike; bi gelek sepandinên
ku ketin merîyetê ve di serî de maf û azadiyên olî û wijdanî, azadî û mafên bingehîn
hatin binpê kirin.
Şoreşa Bêdeng
44
ewlehiyê yên ku gel û welatîyan wek gef didîtîn ji holê hatin rakirin û jêbaweriya eqlê selîma gel ya ku ji dîroka gel diherike tê, hat pejirandin. Wek nîşaneya ji dewleta otorîter derbasbûna dewleta demokratîk, derbarê çareseriya pirsgirêka herî mezin û giran ya welatê me terorê de, ne bi tenê stratejîya ewlehîparêz hat meşandin digel vê stratejîyeke piralî, pirlayenî hat pejirandin. Di serî de di mijara têkoşîna li dijî terorê û yên ewlehiyê de, sepandin û rêbazên ku di dewleteke hiqûqê de nayên qebûlkirin û meşandin hatin terikandin, bi van kirinan ve di rêya asayîbûnê de pêngavên gelek girîng hatin avêtin. Ev pêngavên ku ji bo asayîbûnê hatin avêtin, bi xwe re pêvajoya li hember darazê hesablêpirsîna kesên li dijî demokrasîyê derbe, derbeya post-modern û hewlên ku derbe dikirin armanc jî pêkanîn.
Di vê pêgehê de sepandina rewşa awarte hate rakirin. Dadgehên Ewlehiya Dewletê (DGM) û dadgehên xwedî rayeya taybet jî hatin rakirin. Ji bo bi dawî kirina terorê û ji bo pêkanîna biratî û aştiya civakî “Projeya Biratî û Yekîtiya Neteweyî” hat dest pê kirin. Ji bo ku di mijara têkoşîna li hember terorê re de polîtîka û stratejîyan pêk bîne Misteşariya Ewlehî û Pergala Gel hate sazkirin. Zagona Welatîbûnê jî hat guhertin. Ji bo ku navên berê yên cih û waran jinûve bê dayîn xebat hatin kirin. Jiyana rojane hat hêsankirin. Jênebaweriya ji welatîyan hat rakirin û bîrokrasî hat kêmkirin. Ji hin

pêngavên sereke yên ku di beşa envanterê de bi awayekî kronolojîk hatine rêzkirin wiha e.

Rakirina Rewşa Awarte

Sepandinên rêvebirina rewşa awarte eve ku, heke dewletek li hember talûke û gefên awarte nikaribe bi qaîdeyên asayî yên hiqûqê çareseriyekê pêk bîne, serî li rêyên din dide. Di Makezagona 1982yan de wek «rêvebirina şidiyayî» (sıkı yönetim) û «rewşa awarte» du rêvebirîyên awarte hatine pêşbînî kirin. Ji van rêvebiriyan ûsila rewşa awarte ev e ku, ji ber hin sedeman tê îlan kirin û derfetê dide ku bi awayekî demkî an qismekî an jî temamê azadî û mafên bingehîn bên sekinandin; ji bo welatîyan stûbariya pere, mal û xebatê pêşbînî dike.

2002-2012

45

Rêvebirina şidiyayî jî rêvebirineke awarte ye û şikla rêvebirina wê jî wiha ye ji ber sedemên îlankirina rewşa awarte yên hêj girantir tê îlankirin, bi awayekî demkî rê dide ku qismekî yan jî temamê azadî û mafên bingehîn werin sekinandin û derfetê dide ku li dijî ewlehiyên di Makezagonê de hatibûn pêşbînî kirin tevdîr bên girtin û encamê dide ku rayeyên zebtî (kolluk) derbasî meqamên eskerî bibin.

Sepandina Rewşa Awarte, wek alternatîfa sepandina Rêvebirina Şidiyayî ya

ku ji ber bûyerên terorê yên li hin bajarên Rohilat û Rohilatê Başûrê Anadolê

ya Tirkiyê hate meşandin ku di sala 1987an de hat dest pê kirin. Sepandina

Rewşa Awarte di 19ê Tîrmeha 1987an de bi awayekî demkî hat dest pê kirin

lê belê, li ser hev tam 46 caran hate dirêj kirin û heta sala 2002yan ev rewş
bênavber berdewam kir. Di van heyamên rewşa awarte de, ji ber xwedîbûna
hêzeke mezin ya îdareyê
û kêmkirina mafên
mirovan, pirsgirêkên
mezin derketin holê.
Bi taybetî bi îlankirina
Rewşa Awarte re,
venêrîna darazî jî
dihat binpêkirin, ev jî
nîşan dide ku di mijara
mafên mirovan de ev
heyam qisawetên cidî
dihundirîne. Ev qisawet
bi mehkumiyetên bi
hejmarek cezayên wek
rekor ji aliyê Dadgeha
Mafên Mirovan ya
Ewropayê ku derheqê Tirkiyeyê de hate dayîn jî hate tescîl kirin. Ji aliyê din ve, di vê heyamê de rayeyên pêvek yên ku ji meqamên eskerî re hatin dayîn jî divê werin berçav girtin, tê dîtin ku sepandina rewşa awarte, li ber
demokratîkbûna welatê me yek ji astengên herî mezin e.
Hewldana mezin a yekem a ji
pêngavên demokratîkbûnê ev
e ku, di dîroka 30yê Mijdara

2002yan de pişti duwanzdeh rojan avakirina hikumetê bi şiklekî ku êdî biryara dirêjkirinê nayê girtin û rakirina sepandina rewşa awarte ye. Dema ku dirêjahiya sepandina rewşa awarte û rêvebirina şidiyayî ya di heyamên Makezgonên 1961 û 1982yan de werin berçav girtin, wî çaxî dê baş were fêmkirin ku di sala 2002yan de li giştiyê Tirkiyeyê vegerîna ser rêvebirineke asayî rastî jî rûdaneke gelek girîng e.

Şoreşa Bêdeng

46

Hewldana mezin a yekem a ji pêngavên demokratîkbûnê ev e ku, di dîroka 30yê Mijdara 2002yan de pişti duwanzdeh rojan avakirina hikumetê bi şiklekî ku êdî biryara dirêjkirinê nayê girtin û rakirina sepandina rewşa awarte ye. Dema ku dirêjahiya sepandina rewşa awarte û rêvebirina şidiyayî ya di heyamên Makezgonên 1961 û 1982yan de werin berçav girtin, wî çaxî dê baş were fêmkirin ku di sala 2002yan de li giştiyê Tirkiyeyê vegerîna ser rêvebirineke asayî rastî jî rûdaneke gelek girîng e. Ev pêngav ji aliyê sembolîk ve jî di destpêka “şoreşa bêdeng” de qonaxeke pir girîng e.

Rakirina Dadgehên Ewlehiya Dewletê û Dadgehên Xwedî Rayeya Taybet

Di dengeya azadî û ewlehiyê de wek nîşandana pêşxistina ewlehiyê, Dadgehên Ewlehiya Dewletê (DGM) bi guherînên Makezagona 1973yan ve tevlî pergala darazê bû, lê belê her tim jî hat rexnekirin.

Bi taybetî, cudahiyên di ûsila darizandinê de û ji ber ku ji endamên dadgehê yek dadgerekî eskerî bû, rexneyên li ser DGMyan zêdetir dibûn. Ji ber ku di sepandinan de jî bi awayekî giran bi nêrînên ewlehîparêz doz dihatin encam kirin, rexneyên ser van dadgehan mafdar dihatin dîtin.

Ji aliyê din ve, ji ber ku binesaziya DGMyan li dijî darizîna dadmend ya Peymana Mafên Mirovan ya Ewropayê (AİHS) hat dîtin, Tirkiye ji aliyê Dadgeha Mafên Mirovan ya Ewropayê (AİHM) ve hat mehkum kirin. Ji ber vê sedemê, wek pêngava yekem bi guherîna makezagonî ya ku di 1999an de hat kirin ve sepandina li DGMê hebûna dadgerên eskerî hat rakirin. Di sala 2004an de giştiyê van dadgehan hatin rakirin. Piştî rakirina DGM yan şûna wan Dadgehên Cezaya Giran ya Xwedî Rayeya Taybet hatin avakirin. Ji van dadgehan re, rayeya darizandina sûcên li dijî dewletê û sûcên bi rêxistinî hat dayîn. Lê ji ber pirsgirêkên ku di nav deh salan de derketin ve, bi Qanûna bi dîroka 2/7/2012 û bi jimara 6352 ve ku bi pakêta darazê ya sêyemîn hat qebûl kirin ve, sepandina dadgehên xwedî rayeya taybet jî ji holê hat rakirin. Bi serastkirina nû, êdî dozên ku ji ber van sûcan hatine vekirin wê bi ber destê “Dadgeha

kirin. Dadgehên
Xwedî Rayeya Taybet
yên ku şûna DGMyan
hatibûn avakirin jî di sala 2012an de bi dawî bû û ji bo asayîbûna darazê pêngaveke din ya girîng hate avêtin.
Destpêkirina Projeya Biratî û Yekîtîya Neteweyî
Ji bo qedandina terorê û ji bo pêkanîna biratî û aştiya civakî di 30yê Tîrmêha 2009yan de projeya “Biratî û Yekîtiya Neteweyî” hat dest pê kirin. Bi vê projeyê hat armanckirin ku, li hember pirsgirêka terorê ya ku bi salan e didome û ketiye rewşeke tevlîhev, polîtîkayên çareseriyê yên piralî bên pêkanîn. Di vê çerçoveyê de bi bilindkirina standardên demokrasîye ya Tirkiyeyê ve hat armanckirin ku li welatê me teror biqede an jî bikeve asta herî jêr. Ji bo pêkanîna vê, li aliyekî di qadên demokratîkbûnê de pêngavên girîng tên avêtin, li aliyekî din jî çavkaniyên rêxistina terorê tê ziwakirin û bi wî awayî xebatên ku astengkirina bêşdarbûnên nû yên terorê û kesên ku beşdarî terorê bûne jî dîsa tevlî civakê bibin, didomin.
Bi projeya Biratî û Yekîtiya Neteweyî ya ku wek dewama pêvajoya demokratîkbûn û asayîbûn a pêvajoya di 2002yan de dest pê kiribû ye, hat armanckirin ku standardên azadî û mafên bingehîn werin bilindkirin û qada demokratîkbûnê bê firehkirin bi vî awayî, êdî hemû fikrên cuda bi rengekî aştiyane werin îfade kirin, pêşniyarên çareseriyê bi şiklekî xweşbînî bên nîqaşkirin û
Her wiha heyama bi Dadgehên
Ewlehiya Dewletê yên ku di sala
1973yan de dest pê kiribû di
sala 2004yan de hat dawî kirin.
Dadgehên Xwedî Rayeya Taybet

yên ku şûna DGMyan hatibûn
avakirin jî di sala 2012an de bi
dawî bû û ji bo asayîbûna darazê
pêngaveke din ya girîng
hate avêtin
Şoreşa Bêdeng
48
qadeke azadîparêz û
piranîparêz derkeve
holê.
Bi pêngavên ku di
çarçoveya Projeya
Biratî û Yekîtiya
Neteweyî de hatin
avêtin ve, ji holê
rakirina tirs, tabû
û qedexeyan hat
m i m k u n k i r i n ;
dewlet bi pirsgirêkên
xwe re rû bi rû bû;
pirsgirêkên ku bi
salan e nehatine
axaftin û ji ber vê
mezintir bibûn jî
êdî bi awayekî zelal hatin axaftin û nîqaşkirin. Bi vî awayî, bi saya nîqaşkirina hêsanî ya pirsgirêkan û bi sedema ku dewletê cara yekem vîn û feraseta çareseriyê danî holê, van hemû kirinan di heman demê de peywîra “restorasyona civakî” jî girtin ser xwe.

Di çarçoveya Projeya Biratî û Yekîtiya Neteweyî de pêngavên ku tên avêtin didomin û ji bo hêzdarkirina aîdiyeta hevpar û xebatên ji bo avakirina pêşerojeke hevpar têne meşandin.

Avakirina Misteşariya Ewlehî û Pergala Gel

Di demboriya têkoşîna li dijî terorê ya çil sal in li Tirkiyeyê didome de, gelek caran "li hember têkoşîna li dijî terorê tinebûna stratejîyeke tevahîhewîn, tinebûna saziyeke ku di mijara terorê de ji hêla sivîl û civakî dinihêre, her tim wek kêmasiyeke mezin hat bilêvkirin. Di vê qadê de pêngaveke pir girîng hat avêtin û bi qanûna bi dîroka 17/2/2010 û bi jimara 5952 Misteşariya Ewlehî û Pergala Gel hate

Bi pêngavên ku di çarçoveya
Projeya Biratî û Yekîtiya Neteweyî
de hatin avêtin ve, ji holê
rakirina tirs, tabû û qedexeyan
hat mimkunkirin; dewlet bi
pirsgirêkên xwe re rû bi rû bû;
pirsgirêkên ku bi salan e nehatine
axaftin û ji ber vê mezintir bibûn jî
êdî bi awayekî zelal hatin axaftin
û nîqaşkirin. Bi vî awayî, bi saya
nîqaşkirina hêsanî ya pirsgirêkan
û bi sedema ku dewletê cara
yekem vîn û feraseta çareseriyê
danî holê, van hemû kirinan
di heman demê de peywîra
"restorasyona civakî" jî girtin
ser xwe.

2002-2012

avakirin. Her wiha hate armanckirin ku, di qada têkoşîna li dijî terorê de, digel bikaranîna metodên zanîstî bi daneyan zêdekirina analîzan, pêşniyarên çareseriyê, geşkirina stratejî û politîkayên nûjen derkevin holê û di navbera sazî û dezgehên têkildar de kordînasyon û têkiliyên bilez û bandor pêk bên.

Her wiha di çerçoveya guherîna di paradîgmaya ewlehîyê de, êdî ji bo ku di çareseriya pirsgirêkê de tenê tevdîrên ewlehiyê neyên fikirîn nêrîneke nû hate pejirandin, bi vê nêrînê re jî têkoşîna li dijî terorê berçavkirina di çarçoveyeke pirpiralî de bi hêlên hiqûqî, psîkolojîk û civakî dê were bi dest girtin, li gor daneyên zanîstî yên civakî wê were tevgerîn û ji tecrûbeyên navneteweyî jî sûd bê wergirtin.

Lêvegerandina Mafên Kesên Ku Ji Hemwelatîbûnê Hatine Derxistin

Bi taybetî di heyamên derbeyên eskerî û piştî derbeyên eskerî de gelek caran welatî ji hemwelatîbûnê dihatin derxistin, ev rêbaz gelek caran dihat bikaranîn. Ji ber ku mirovên me ji ber hincetên kêfî û siyasî ji hemwelatîbûnê dihatin derxistin, ev yek him dibû sedema mexdûriyeta wan him jî malbatên wan.

Di vê çarçevoyê de di sala 2009an de derbarê welatîbûnê de zagonek nû hate derxistin û ji kesên ku li dijî dewletê tevgerîyane û mafê welatîbûnê windakirine re, derfet hate dayîn ku Lijneya Wezîran bikaribe jinûve mafê welatîbûne bide wan. Bi vê sepandinê kesên ku di heyama derbeya 12 Îlonê de an jî paşê ji ber bûyerên siyasî bi neçarî koçî derveyî welêt kirine û mafê welatîbûnê ji dest berdane re, rêya jinûve girtina mafên welatîbûne hate vekirin.

Hêsankirina Jiyana Rojane

Di heyamên berê de ji ber sedemên ewlehiyê, li ser rêyan gelek cihên

venêrîn û lêgerînê hebûn û ev jî dibûn sedema tengasîyan, lewra ji ber lihevkombûna wesaîtan yên ku dorên dirêj çêdibûn, welatîyan bi awayekî mafdar gazin dikirin. Di salên 1990an de li Rohilat û Şoreşa Bêdeng

50

Başûrê Rohilatê ev xalên venêrînê yên ewlehiyê ji bo welatîyên ku li wan hêreman dijîn, pirsgirêkeke mezin ya rojane derdixist holê. Ji bo ku jiyana rojane ya welatîyan hêsantir bibe, di serê sala 2010an de giştînameyek hate derxistin û her wiha hejmara cihên ewlehiyê yên li ser rêyan hat kêmkirin.

Dîsa di salên berê de bi hinceta ewlehiyê, mêrg û zozanen ku hemwelatîyên me lê dijîyan, hatibûn qedexekirin. Vê sepandinê zirar dida aborîya herêmê. Bi armanca ku refah û aborîya welatîyên me zêde bibe qedexeyên bikaranîna mêrg û zozanên herêmên Rojhilat û Başûrê Rojhilat di serê sala 2010an de hate rakirin.

Lêvegerandina Navên Deverên Kevin Yên Hatibûn Guhertin

Navên erdîgariyê di jiyana însanan de cihekî girîng digire lewra bi saya van navan însan ji demboriyê heta niha jiyanek ava kirine. Di vî warî de dibe were gotin ku hemû navê cihan di nav paşplana dîrokî de kok dane. Li Tirkiyeyê jî navê gelek herêman ji ber sedemên îdeolojîk û sîyasî hatibûn guherandin. Gelên herêmê nedikarîn navên ku di nav çand û zimanên wan de cih digirin, bidin cih û warên xwe. Ji ber vî hîsên aîdîyetê yên welatîyên me hatibûn zedekirin. Daxwazên di vê mijarê de hatin nirxandin û rê hate vekirin ku piştî gelek salan ji bo hin cihan, navên berê hatin îadekirin.

Bi Jiholêrakirina Jênebaweriya Welatiyan Kêmkirina Bîrokrasiyê

Ji bo ku ji xîzmetên gelemperî bi awayekî lezgîn, sûdewar, qelîte û zelal were dayîn pewîstî bi sîstemeke bîrokratîk a bi rêkûpek heye. Ji ber ku di saziyên gelemperî de kirdarî dirêj dom dikin ev yek him dibe sedema wextwindakirinê him jî dewlet li cem gelê xwe îtîbara xwe winda dike. Ji aliyê din ve ji ber qaîdeyên bi hurgilî û zedebûna belgeyên ku ji welatîyan têne xwestin, wiha tê fêm kirin ku dewlet ji gelê xwe ne bawer e. Di vê pêgehê de ji ber karûbarên kirtasîyevanîyê 2002-2012

û dirêjbûna pêvajoya van karûbaran, welatîyên bê guneh û dirûst dikevin nav tengasîyan.

Di deh salên dawî de digel pêngavên ji bo kêmkirina bîrokrasîyê, dema ku mirov bi welatên Ewropayê re dide berhev, dibîne ku mekanizmayên karûbarên gelemperî gelek hêdî û giran dimeşin û ji ber van jî ji bo welatîyên ku rastî mexdûriyetan tên bigihîjin xizmetên gelemperî yên bingehîn yên wek darayî, tendûrîstî û perwerdehiyê, bi awayekî berfireh hewl hate dayîn ku di van qadan de astengîyên bûrokratîk werin rakirin.

Ji sala 2000an pê ve di çarçoveya demokratîkbûnê de astengîyên li ber azadiya fikr û ramanê jî hatin kêmkirin, bi vê kirinê re jiyana rojane ya gel hesantir bû û bawerîya bi dewletê rejî zêdetir bû. Ev pêngavên ku di çarçoveya kêmkirina bîrokrasiyê û jiholêrakirina jênebaweriya gel de hatin avêtin, wek perçeyekî pêvajoya demokratbûnê jî dibe ku were nirxandin.

Di vê pêgehê de him ji bo pêkanîna rêvebirineke gelemperî ya zelal ku ji beyana welatîyên xwe re bi bawer e, hesab dide, sûdewar, bi bandor e û him jî ji bo ku xizmetên gelemperî lezgîntir, hêsantir, bi qalîte û lêçûyînên wê kêm bin, ûsil û esasên ku divê rêvebirî li gor

wan tevbigerin jinûve
hatîn serastkirin.
Di serî de ji bo
paqijkirina hukmên
ku derfet nemaye
bên sepandin,
serastkirina hukmên
nakokî, hêsantir
kirin û bi qelîtekirina
mewzûatê, di sala
2007an de “Qanûna
Derbarê Ji Merîyetê
Rakirina Hin
Bi vê serastkirina ku armanca
wê kêmkirina bîrokrasiyê û
yekkirina kirdarîyen rêvebirîyê
bû, 421 belge ji merîyetê hatin
rakirin, di 215 xizmetan de jî
pewîstiya pejirandina noterê
hate rakirin. Her wiha 46 rayê ji
navendê hatin hildan, ew kirin
deverên dernavendî, 26 raye ji
walîtî û midûrîyetên herêman
hatin standin û ketin bin banê jêrî
meqamê wan.
Şoreşa Bêdeng
52
Qanûnên Ku Derfeta Pêkanînê Winda Kirine” hate qebûl kirin.

Piştre jî bi “Rêziknameya Derbarê Esas û Ûsilên Dayîna Xizmetên Gelemperî û Xebatên Yekkirina Kirdariyên Bîrokrasiyê” ve, li ser rêziknameyên 170 sazîyên ku girêdayî Serokwezîrtî û Wezîrtiyane guhertin hatin kirin. Bi vê serastkirina ku armanca wê kêmkirina bîrokrasiyê û yekkirina kirdarîyen rêvebirîyê bû, 421 belge ji merîyetê hatin rakirin, di 215 xizmetan de jî pewîstiya pejirandina noterê hate rakirin. Her wiha 46 rayê ji navendê hatin hildan, ew kirin deverên dernavendî, 26 raye ji walîtî û midûrîyetên herêman hatin standin û ketin bin banê jêrî meqamê wan.

Bi van serastkirinan, kirdariyên ku wek astengîyên bîrokratîk li hember însanan disekinîn, kirtasiyevaniyê cihekî bê hewce digirt ku ji berev dibû sedema windakirina dem û çavkaniyan hatin kêmkirin. Her wiha ji bo ku rêvebirina gelemperî bigihîje binesaziyeke bi bandor û xizmetxwaz, kirdarî sivik û lezgîn bibin, pêngavên girîng hatin avêtin. Di vê çarçoveyê de di xizmetên ku ji aliyê rêvebirîyên herêmî û îdareya navendî ve dihatin dayîn de, hate aramanckirin ku serastkirinên li ser agahî û belgeyên ne hewce hîm girtibûn bên rakirin, bi guherîna di hin xizmetan de jî bi rêyên elektronîk dayîna xizmetê ve, hate aramanckirin ku li ber îsrafa belgeyan were girtin. Xizmetên ji aliyê dewletê ve bi mesref û bi kûlfet yên ku li ser şiklên qaîdeyên hurgilîyan jî li ser kaxizê dihatin dayîn, di çarçoveya organîzasyona e-dewletê de di qada dijîtal de bi awayekî lezgîntir, bi ewle û bê navber hatin dayîn. Bi saya e-dewletê, sazî û dezgehên gelemperî, xizmetên xwe di qada teknolojîya îroyîn de bê astengîyên bîrokrasiyê pêk tînin. Di karên fermî de cihê xwestina eslê ewraqan, bi baweriya beyana welatîyan, nomereya T.C, navnîşana îkametgahê, agahiyên ragîhandin û nasnameyê wek bingeh têne girtin û kirdarî têne pêkanîn. Sepana e-dewletê ne bi tenê di navbera welatî û dewletê

de, di navbera saziyên gelemperî de jî herikîna agahiyan her çûye lezgîn kiriye, li ser sûdewariya xizmetên gelemperî bandoreke erênî pêk aniye.
2002-2012
53
Di qada gelemperî de pirsgirêkek din jî di sektora tenduristîyê de bû. Lewra li wir xizmet bi rêkûpêk nedihat dayîn û tevlihevî hebû. Bi rakirina zincîra sewkê ya ku di salên dawî de di sektora tendûrîstiyê de dihat sepandin, wek dezgehên Sindoqa Teqawîtbûnê (Emekli Sandığı) Bağ-Kur û SSKê di bin banê Sazîya Ewlehîya Civakê de (Sosyal Güvenlik Kurumu) hatin kom kirin. Nexweşxaneyên SSK û dewletê hatin yekkirin û ji bo ku nexweş li nexweşxaneyên taybet jî bikaribin tedawî bibin rê hate vekirin. Bi van sepandinan asta qalîteya xizmeta sektora gelemperî pêşve çû, jîyana rojene hêsantir bû, jêbaweriya welatîyan derket holê.
Di têkiliyên dewlet û gel de pirsgirêkeke din jî rêvebirên ku ji meqamên jor li civakî dinhêriyan, welatîyan nikaribûn ku derd û kulên xwe ji wan re bêjin, van kesan rûyê dewletê yê hişk û otorîter temsîl dikirin. Lê di vî warî de jî pêngavên pir girîng hatin avêtin. Di demên dawî de rêvebirên ku nû hatin tayîn kirin rû guherî û dilovaniya germ ya dewletê nîşanî gel didin. Ev rêvebirên nû bi nirxên civakê re lihev hatine, hembêzkar in, çareseriyan pêk tînin û di karên xwe de jî însanan wek navend digirin.
PÊNGAVÊN DI WARÊN VENÊRÎN Û
ÇAVNÊRIYA SIVÎL DE HATINE AVÊTIN
2002-2012
57
PÊNGAVÊN DI WARÊN VENÊRÎN Û ÇAVNÊRIYA

SIVÎL DE HATINE AVÊTIN

Wek di beşên beriya vê bêşê de jî hat dîyarkirin, yek ji pirsgirêka herî mezin ya Tirkîyê jî cihê venerîn û çavnêriya sivîl û demokratîk, heyam bi heyam venerîn û çavnêriya eskerî, bîrokratîk û yan jî darazê wergirt. Ev sepandinên li dijî demokrasîyê ne ku hêza xwe ji makezagonên 1961 û 1982yan digirtin, mijarên nîqaşê yên sereke yên heyama nêz bûn. Di sala 1950î de digel ku Tirkîye derbazî jiyana siyasî ya demokratîk bibû lê dîsa jî dewlet bi serokkomarê ku ji alîye gel ve nehatibû hilbijartin û rayeya wî zêde ve dihat birêvebirin. Dîsa civînen MGKê yên ku ji lijneya wezîran girîngtir dihatin dîtin, nîqaşên ku li ser hatine wazîfedarkirin û hatine hilbijartin, destwerdanên darazê yên ku li ser guman dihatin kirin, biryarên Dadgeha Makezagonê yên ku ji gel ve tu piştgirî û bawerî vernedigirtin, mijarên sereke yên dihatin nîqaşkirin bûn.

Digel van rûdanan Tirkîye di salên dawî de, li herêma xwe, him li aliyekî wek dewleteke ku bi rêvebirineke demokratik tê rêvebirin derket pêş him jî li alîyê din jî bi rêvebîriya xwe ya xwedî feraseta venerîn û çavdêrîya navenda dewletê hewl da ku pozîsyona xwe ya berê biparêze. Tirkiye tevî nêrîna wesateyê ya kevn ya ku şertên taybet, yên ku li hember pêkanîna dewleteke hiqûqê ya di standarda cîhanê de wek astengî didît/hewl dida bide xuyîn, di qada venêrîn û çavderiya Sivîl de bi hin reformên girîng, di rêya demokratîkbûnê de pêngavên mezin avêtin.

Şoreşa Bêdeng

58

Di vê çerçoveyê de şerta divê ‘Sekreterê Gîştî yê MGKê ekser be’ hat rakirin û rêya sekreterê sivîl hate vekirin. Her wiha rayeya daraza eskerî jî hate tengkirin. Protokola EMASYA yê ya ku beyî

destûra walî destwerdana çalakiyan dikaribû bike jî hat rakirin. Her wiha pêwîstiya hebûna endamên esker ji bo hin rêvebirîyên sazî û dezgehên wek YÖK, RTÜK û Lijneya Bilind Ya Xeberdayînê jî hat rakirin. Ji bo ku li welêt pergala wesayetê bişkê, vîna gel serdest bibe, rê hate vekirin ku ji aliyê gel ve serokkomar were hilbijartin. Li hember biryarên Şûraya Eskerî Ya Bilind rêya darazê hat vekirin. Her wiha darizandina derbekarên 12 Îlonê jî destpê kir.

Di beşa envanter ya vê pirtûkê de, ji van pêngavan yên sereke ku wek kronolojîk bi awayekî hurgilî hatine rêz kirin li jêr hatin vegotin:

Ji Aliye Gel Ve Hilbijartina Serokomar

Di navbera salên 2002-2012an de ji bo demokratîkbûn û bilindkirina standardên dewleta hiqûqê, yek ji reforma ku pêk hatin ya herî girîng jî di sala 2007an de bi referandûmê qebûlkirina 'Ji Aliye Gel Ve Hilbijartina Serokomar'e.

Bi Makezagonên 1961 û 1982yan ve wek nîşandana encama modela bîrokratîk û wesayetparêz meqama Serokomartîyê cihekî taybet girtîbû. Li berovajiyê meqama serokkomariyê ya ku di pergala parlamenterî de, xwediyê rayeyên sembolîk e, meqameke serokkomariyê ya ku xwediyê rayeyên gel berfirehe hatibû damezirandin. Bi taybetî jî ji ber mafên hêzênrêvebirtiyê û rewşa bi bandor ya li ser tayînên bîrokrasiyê û rola dîyarkirina pêkanîna endamên darazê, Serokomar di nav pergalê de bû aktorekî hêzdar û girîng. Ango bi saya mekanizmayên wesayetparêz yên Makezagonên 1961 û 1982yan ve rayeyên meqama Serokomartiyê hatin berfirehkirin. Ev rayeyên berfireh yên Serokomar bi "biryarnameyên sêber"("üçlü kararname") an jî rasterast di peywirdarkirina bîrokratên astbilind, rektorên zanîngehan, endamên daraza bilind de, di vetokirina biryarên meclîsê de li ser gelek waran hatibû belavkirin.

Ji alîyê din ve ji ber ku di hilbijartina serokomar de yê ku bi rayeyên pir mezin hatibû hêzdarkirin de, gel zêde xwedî gotinê nebû, hesab dayîna vê meqamê hatibû astengkirin. Li cem van rayeyên desthilatdariyên ku ji aliyê gel ve dihatin hilbijartin jî li lehê meqama Serokomariyê hatibû tengkirin, ji ber vê rewşê ev meqam li ser gel dorpeçkirina wesayetê pêk anîbû. Tevî rêgeza “li gor berpirsyarî û rayeyan” yên Serokomar yên ewqas bi hêz, tu berpirsyariyên vê meqamê ji tuneye ku ev jî di pergala parlameteriyê de wek mijareke çewt derdikeve pêş me.

Ev hemû tişt nîşan didin ku meqama Serokomartiyê wek parêzer û piştgirê pergala wesayetê û temînata ji pergalê re desthilatbûna nêrîna wesayetparêziyê, hatiye dîtin. Bûyerên ku di pêvajoya hilbijartina Serokomarî ya 2007an de pêkhatin û biryara ku Dadgeha Makezagonê li gor sîstema wesayetparêziyê bicih kir û girîngiya meqama Serokomariyê di nava sîstemê de raxist ber çavan. Di sala 2007an de biryar hat dayîn ku êdî ev aktorê ku di nav sîstema sîyasetê de pir hêzdar e dê ji alîyê gel ve bê hilbijartin. Ji aliyê gel ve hilbijartina serokomar, di warê jiholêrakirina manewreya herî hêzdar ya “wesayeta olîgarşîk” de pêngaveke pir girîng e. Bi saya vê pêngavê derbeyek mezin li sîstema wesayetkaran hate xistin û bi vê

kirinê nêrîna dewleta desthilat ku gelê xwedî desthilatê ye berbiçav negirtiye hatiye pêk anîn hate dawî kirin, ji pêvajoya demokratîkbûna Tirkiyeyê ya ku di sala 1950î de dest pê kiribû, lê nîvco mabû re jî tevkariyeke girîng da.

Di sala 2007an de biryar hat dayîn ku êdî ev aktorê ku di nav sîstema sîyasetê de pir hêzdar e dê ji alîyê gel ve bê hilbijartin. Ji aliyê gel ve hilbijartina serokomar, di warê jiholêrakirina manewreya herî hêzdar ya “wesayeta olîgarşîk” de pêngaveke pir girîng e.

Şoreşa Bêdeng

60

Ji Bo Sekreterê MGKê Bibe Sivîl Serastkirin

Sivîlkirina MGKê ya ku li ser rêvebirîyên sivîl her tim bû asteng û li ser wan wek saziyek wesayetparêz tevgeriya, ji bo demokratîkbûna Tirkîyeyê pir girîng bû. Di vê çarçoveyê de di nav sala 2003yan de Pakêta Ahengsaziya Heftemîn ya Yekîtîya Ewropayê hate çekirin û her wiha di mijara Sekretertiya Giştî ya MGKê de, hin guhertin hatin kirin. Di eslê xwe de bi vê sepandinê guhertina sala 2001ê, li gor Makezagonê hate serastkirin. Tevî ku di makezagonê de xalek pir zelal tunebû jî, bi guhertina hate kirin ve, ji bo bûyîna Sekreterê Giştî yê MGKê şerta ‘divê esker be’ hate rakirin û peşiya sekreterên sivîl hate vekirin.

Pêkanîna derfeta Sekreterê Giştî yê MGKê dibe ji nav sivîlan jî be tayînkirin,

li welatê me ji bo sivîlbûnê pêngaveke pir girîng e. Her wiha MGK wekî

di demokrasîyên nûjen û pêşveçûyî de, êdî di polîtîkayên hikumetê yên ewlehîya neteweyî de wek endama şêwirmendiyê dê cih bigire. Êdî bi peşnîyarkirina serokwezîr û bi erêkirina serokomar, Sekreterê Giştî yê MGKê dê bê tayînkirin. Di heman pakêtê de biryar hate dayîn ku Lijneya ku her meh kom dibû, êdî du mehan carekê kom bibe.
Bi van guherînan re di civînên MGKê de pergala rûnîştinê jî hate guherandin. Berîya niha hêla eskerî û hêla hikumetê ji hev cuda û li hemberî hev rûdinîştin. Ev rûniştin di hişê raya giştî de jî dibû sedema fikra 'hêla eskerî' 'hêla sivîl'. Ev sîstem hate guherandin. Sîstema ku li kêleka hev û tevlîhev bê rûniştin hate pejirandin.
Tengkirina Qada Rayeya Daraza Eskerî
Li Tirkiyeyê sîstema daraza eskerî, piştî derbeyên eskerî yên makezgonî hatîye avakirin. Ji ber vê yeke jî di darazên eskerî de ji alîyekî ve darizandina kesên Sivîl hatîye kirin, ji hêla din ve jî kesên ekser ji ber sûcên ku tu eleqa wan bi eskeriyê re tune ye, di darazên eskerî de hatine darizandin, lewra raye û peywirên dadgehên eskerî darizandina van sûcan dihewand.
2002-2012
61
Ji bo guherandina pergala daraza du hêlî ya ku ne li gorî prensîbên dewleteke hiqûqî ye, du pêngavên pir girîng hatin avêtin. Di serî de bi Qanûna hejmara 4963ê ve bandora biryarên Qanûna Cezaya Eskerî ya li ser kesên sivîl hate sînordarkirin. Wek pêngava duyemîn, eskerên ku ji ber sûcên xwe û yên bi taybetî bi hewldana derbeyê tên sûcdarkirin, esasa darizandinê hate pêkanîn ku dê bi awayekî rasterast di dadgehên Sivîl de bên darizandin. Lê ji aliyê Dadgeha Makezagonê ve, ev serastkirin wek hincet nîşandana madeya 145. ya Makezagonê, hate betal kirin. Ji ber vê yeke jî ev mijar di sala 2010an

de di çarçoveya guherandina Makezagonê de hate bidest girtin. Bi saya guhertinên di daraza eskerî de, eskerên ku bi sûcên ‘hewldana guhertina sîstema makezagonî û derbeyê tên sûcdarkirin, dê li dadgehên sivîl bêne darizandin.

Rakirina Protokola EMASYA

Wek tê zanîn ewlehiya nav welêt di bin kontrola hêzên girêdayî Wezareta Karên Hundir de ye. Ji ber vê yekê jî hêzên ewlehiyê di bin çavdêrî û venêrîna walîtî û qaymeqamtîyê de, di nav pergaleke hiyerarşîk de wazîfeyên xwe dikin. Lê berovajîya vê yeke, li hemû welatên din hêzên çekdar parastina welêt û ewlehiya derve pêk tînin. Li gor mewzûeta di warê pêkanîna ewlehiya hundir de, destwerdana hêzên çekdar bi bûyerên civakî û şerta daxwaza walî ve hatiye girêdan. Lê di heyama 28ê Sibatê de, bi zêdebûna bandora wesayeta eskerî, bi protokala EMASYAyê, ya ku li dijî Qanûna Rêvebirina Bajêr ya bi hejmara 5442yan e rê vekir ku bêyî destûra waliyan, hêzên çekdar bikaribin li bajêr destwerdana bûyerên civakî bikin.

EMASYA kurtkirina peyvên Ewlehî-Asayîş-Alîkarî ye ku navê protokola ku di navbera Wezareta Karê Navxweyî û Serokatîya Sererkanîyê de, di sala 1997an de hatibû îmzekirin. Li gor Protokola EMASYAyê Walîtî, rayeya xwe ya di Qanûna Rêvebirina Bajêr de bikar neyîne jî, rayedarên eskerî heke hewce bibînin, dikaribûn destwerdana bûyerên civakî bikin.

Şoreşa Bêdeng

62

Di dîroka protokola ku 13 sal dom kir de, rayeya destwerdana hêzên eskerî ya bûyerên civakê her tim bi awayekî gur hat rexnekirin. Wek encama van rexneyan, bi protokola ku di navbera Wezareta Karên Navxweyî û Serokatîya Sererkaniyê

de hat îmzekirin de dîroka 4/2/2010an Protokola EMASYA ji Merîyetê hate rakirin.

Bidawîkirina Sepandina Endamên Eskerî Yên Di Hin Sazîyan De

Piştî derbeya eskerî ya 12ê Îlona 1982yan têkilîyên wan hebe yan tune be, di gelek sazîyan de nûnerên esker hatibûn bicihkirin. Ji ber vê sepandinê di gelek saziyan de meşandina xizmetên gelemperî pir dijwar dihate pêkanîn, wisa dihate xuyîn bi awayekî giştî hemû jiyana sivîl û civakî di bin çavderî û venêrîna wesayeta eskerî de ye. Her wiha bi guhertinên deh salên dawî, di gelek sazî û dezgehan de dawî li endamên eskeran hate anîn. Di vê çarçevoyê de hukmên ji aliyê Serokatiya Sererkaniyê ve, ji Saziya Hîndekarîya Bilind (YÖK) re hilbijartina endaman û ji aliyê Sekreterê Giştî yê MGKê yê Sererkaniyê, ji bo Lijneya Bilind ya Radyo û Televîzyonê (RTÜK)ê namzet nîşan dayîn ji Merîyetê hate rakirin. Ji aliyê din ve, endamtiya Lijneya Bilind Ya Xeberdayînê ya Sekreterê Giştî yê MGKê hate bidawîkirin.

Li Dijî Biryarên Şûreya Eskerî Vekirina Rêya Darazê

Li gor dewleta hiqûqî, her cure kirdarîyên îdareyê divê di bin çavdêriya darazê de bê kirin ku ev jî ji bo parastina maf û azadîyên bingehîn ji reyên herî girîng reyek tê qebûlkirin. Li tevî vê Makezagona 1982yan, Şûreya Eskerî ya Bilind (YAŞ) terfî kirin û di hemû mijarên puxteyî de wek rayemend qebûl kiribû û li hember biryarên YAŞê rêya venêrîna darazê jî girtibû. Bi taybetî di heyamên wesayetparêz de gelek serbaz û berbaz bê destûrdayîna xweparastinê li ser kirdariyên dosyayan, bi biryarên YAŞê ve ji arteşê hatibûn dûr xistin û di vî warî de gelek mexdûriyet

2002-2012

derketibûn holê. Ev rewş, li qada welêt û derwelêt gelek caran dibû mijara rexneyên girîng.
Biryarên YAŞê di salên demborî de bi temamî li derî venêrîna darazê bûn, lê di çarçevoya guhertina 2010an ya Makezagonê de, ji bilî kirdarîyên terfî û ji ber tunebûna kadroyê teqawîtbûnê, li hember hemû sepandinên têkilîbirînên YAŞê, rêya darazê hate vekirin. Her wiha ji kesên ku bi biryara YAŞê ji artêşê hatinê avêtin re rêya serîlêdanê hate mîsogerkirin û bi vî awayî di rêya dewleta hiqûqî de astengîyeke din jî ji holê hat rakirin.
Vekirina Rêya Darizandina Derbekarên 12ê Îlonê
Bi guherîna Makezagonî ya sala 2010an madeya 15. ya Demkî ya Makezagona 1982yan hate rakirin. Ev made rê li ber darizandina endamên Konseya Ewlehiya Neteweyî ya ku derbeya 12ê Îlonê pêk anî bû digirt. Wek vê madeyê, hukmeke din ji bo endamên Komîteya Yekîtiya Neteweyî ya ku derbeya eskerî ya 27ê Gulana 1960an pêk anî bû, di madeya 4. ya Demkî ya Makezagona 1961ê de jî hebû. Bi encama vê pêngavê derbarê derbekarên endamên Konseya Ewlehiya Neteweyî yên ku hê dijîn pêvajoya lêpirsîn û darizandinê dest pê kir. Di warê sembolîk de be jî, ji 30 sal piştî derbeya 1980yî, rakirina madeya 15. ya Demkî pêngaveke pir girîng e. Bi vê guherînê re

peyameke bi hêz hate dayîn ku, kesên sîstema hiqûqî û demokratîk ji holê rakirin yan jî hewil dan ku ji holê rakin, zû yan jî dereng dê rastî mijara darazê bibin.

Biryarên YAŞê di salên demborî de bi temamî li derî venêrîna darazê bûn, lê di çarçevoya guhertina 2010an ya Makezagonê de, ji bilî kirdarîyên terfî û ji ber tunebûna kadroyê teqawîtbûnê, li hember hemû sepandinên têkilîbirînên YAŞê, rêya darazê hate vekirin.

Şoreşa Bêdeng

64

Di Bin Banê Meclîsa Mezin Ya Gel Ya Tirkiyê (TBMM) De Avakirina Komîsyonên Lêkolînê

Derbe, nûnerên gel yên hatibûn hilbijartin û rewa, ji kar dûr xistibûn, di ser de jî pergala hiqûqê jî bi awayekî mezin tehrîb kiribûn, bibûn sedema gelek binpêkirina mafan. Di vê pêgehê de ji nav pirsgirêkan girîng yên li Tirkiyeyê yek jî ev e ku, bi derbeyên demborî re rûbarî nehatibû kirin û ji binpêkirinên mafên mirovan hesab nehatibû pirsîn. Ji ber vê pêşketina çanda demokrasiyê hat astengkirin, him jî mesafeya di navbera dewlet û gel de her ku çû vebû. Li dinyayê, welatên ku piştî rêvebirinên eskerî derbasî demokrasîyê bûn, bi sepandinên di heyama eskerî de hatin jiyîn re, rûbarî bûn û hewil dan ku xeletiyên di vê heyamê de pêk hatine werin baş kirin. Li tevî vê jî li Tirkiyeyê, bi demeke dirêj rûpelên tarî yên demboriyê nehatin dîtin. Di sala 2012an de di bin banê TBMMê de “Li Welatê Me Ji Bo Hemû Derbe û Muxtirayên Ku Destwerdana Demokrasîyê Kirin û

Hemû Hewildan û Pêvajoyên Ku Demokrasî Akîm Kirin Bi Hemû Hêlan Bên Lêkolandin û Tevdîrên Hewce Bên Girtin Komîsyona Lêkolîna Meclîsê" hate damezrandin.

Di ve kkomîsyonê de hemû partîyen ku li TBMMyê cih digirin hatin temsîlkirin û gelek kesên ku di raya giştî de baş tên naskirin jî hatin guhdarîkirin. Dîsa di bin banê Komîsyona Daxwaznameya TBMMê de di sala 2012an de 'Komîsyona Li Jêr BabetaDersîmê' hate avakirin û vê komîsyonê di arşîvên dewletê de lêkolînên kûr û dûr meşandin. Di vê çarçoveyê de derbarê Bûyerên Dersîme ku di sala 1930an de pêkhatin de agahî, dane, belge hatin komkirin û her wiha mexdûrên wê heyamê jî hatin guhdarîkirin. Ji bilî van di dîroka 13ê Cotmeha 2011an de di bin banê KKomîsyona Mafên Mirovan ya TBMM'ê de 'KKomîsyona Jêrîn ya Lekolînkirina Binpêkirinên Mafên Jiyanê Yên Di Çerçoveya Bûyerên Teror û Tundiyê De' hate avakirin. Di vê Komîsyonê de ji bo ku ji hemû hêlan ve bûyer were lêkolandin û ji hemû aliyan re mafên axaftin û pêşxistina nêrînan were dayîn, ev xebat wek pêşxistineke girîng tê qebûlkirin. Ev komîsyonên ku hatin sazkirin, dibe ku wek vîna dewletê ya ku bi xeletiyan re rûbarî bûnê û sernegirtina xeletiyan jî were dîtin.

PÊNGAVÊN KU DI WARÊ PARASTIN
Û PÊŞXISTINA MAFÊN MIROVAN DE
HATIN AVÊTIN
2002-2012
67

PÊNGAVÊN KU DI WARÊ PARASTIN Û
PÊŞXISTINA MAFÊN MIROVAN DE HATIN AVÊTIN

Wek tê zanîn mijara mafên mirovan piştî 2. Şerê Cîhanê, di qadên navneteweyî de her çû girîngtir bû. Di serdema me de jî mijara mafên mirovan bi tenê wek pirsgirêka navxweyî ya dewletan nayê

dîtin. Di vê çarçoveyê de dewlet di peymanên navneteweyî yên
mafên mirovan de
bûne teref, sîstemên
hiqûqa navxwe jî
ji bo ku li gor van
peymana bibin,
hewlên hewce avêtin
û ji mekanîzmayên
venêrîna navnetewî
mafê serledana şexsî
qebûl kirin.
Di mijara mafên
mirovan de, li
dinyayê ev pêşketin
pêk dihatin, lê
beriya salên 2000an
li Tirkiyeyê, mirov
nikare bêje ku rewşa
mafên mirovan dixuya. Di van salan de gelek kesan bi hinceta
binpêkirina mafên mirovan, îşkenceya sîstematîk serî li Dadgeha
Di mijara mafên mirovan de, li
dinyayê ev pêşketin pêk dihatin,
lê beriya salên 2000an li Tirkiyeyê,
mirov nikare bêje ku rewşa mafên
mirovan dixuya. Di van salan de
gelek kesan bi hinceta binpêkirina
mafên mirovan, îşkenceya
sîstematîk serî li Dadgeha Mafên

Mirovan ya Ewropayê (AİHM)
dan, Tirkiye jî di serîlêdanên van
mijaran de, di nav welatên din
rêza pêş de cih girt. Zêdehiya
binpêkirina jîyana taybet, tade
û îşkenceyên ku di gîrtîgehan de
dihatin kirin, şert û mercên xirab
yên li girtîgehan di nav mijarên
neyînî de cihên sereke werdigirtin.
Şoreşa Bêdeng
68
Mafên Mirovan ya Ewropayê (AİHM) dan, Tirkiye jî di serîlêdanên van mijaran de, di nav welatên din rêza pêş de cih girt. Zêdehiya binpêkirina jîyana taybet, tade û îşkenceyên ku di gîrtîgehan de dihatin kirin, şert û mercên xirab yên li girtîgehan di nav mijarên neyînî de cihên sereke werdigirtin.
Di 10 salên dawî de li Tirkiyeyê ji bo ku biryarên AİHMê yên ku dezgeheke venerîna Peymana Mafên Mirovan ya Ewropayê ye bêne cih, di mewzûatê de guhertinên girîng hatin kirin û ji bo parastin û pêşxistina mafên mirovan pêngavên cidî hatin avetin. Ji bilî van pêşketinan, mafê serîlêdana şexsî ji Dadgeha Makezagonê jî destpê kir. Bi saya vî mafê serîlêdanê, serîlêdanên li AİHMê yên welatîyên Tirkiyeyê dê kêmtir bibin.
Di vê pêgehê de polîtîkaya ‘ji işkencê re sifir tolerans’ bi awayekî serkeftî kete Merîyetê. Bûyerên kiryar nedîyar û binpêkirinên jiyana taybet ji rojeva Tirkîyeyê hatin derxistin. Şert û mercên binçavkirinê hatin başkirin û her wiha navendên ewlehiyan jî hatin modernîzekirin. Li gor biryarên AİHMê rêya nûkirina darizandinê

jî hate vekirin. Girêbestên di derbarê mafên mirovan de li ser hiqûqa navxweyî hatin pejirandin û ji bo reformên di pêvajoya pêşketina YEyê pêk tên bişopîne Koma Şopgerên Reformê jî hate avakirin.
Ji bo rêvebirineke şefaf, mafê agahî girtinê jî hate dayîn “Peymana Navneteweyî Ya Derbarê Mafên Çandî, Civakî û Aborî Ya Neteweyên Yekbûyî” û “Peymana Navneteweyî Ya Derbarê Mafên, Siyasî û Şarîstanî Ya Neteweyên Yekbûyî” ku wek peymanên cêwî dihatin nasîn hatin erêkirin. Cezayê mirinê hate rakirin.
Bi serastkirinên ku damezirandina komeleyan, hêsankirina xwedî milkbûna weqfan, berfirehkirina mafên çalakî û civînan pêk hatin ve, li gor AİHSê azadiya maf xwestinê û di qada siyasî û civakî de rêxistinbûn hate berfirehkirin. Bi derxistina qanûna çapamenîyê ya nûjen rê li ber sepandinên girtina weşanxane û destdanîna ser amûrên çapemenîyê hate girtin. Ji jêderên rojnamegeran re ewlehiya parastinê hate pêkanîn. Bi serastkirinên qanûnî ve binesaziya sîstemeke dadmendiya cezayan ya nûjen hate pêkanîn.
2002-2012
69
Ji bo welatîyên me ji Dadgeha Makezagonê re mafê serîlêdana şexsî ya jî hat. Mafê serîlêdana darazê ya karmendên dewletê hate berfireh kirin û tengkirinên li ser çavdêrîya darazî hatin rakirin. Mafên sendîkeyên karmendên dewletê hate xurtkirin û ji wazîfedarên gelemperî re mafê peymana komî hate dayîn Ji alîyê din ve mafên zarokan jî hatin berfirehkirin. Bi qanuneke nû ve zarokên ji 18 salî bbiçûktir re rêya darizandina li dadgehên zarokan hate vekirin.
Azadiyên partîyên sîyasî jî hatin berfireh kirin û Her wiha lijneya çavdêrên gelemperîyê û lijneya mafên mirovan ya Tirkiyeyê jî hate Damezirandin. Di warê fikr û ramanên olî de jî gelek pêngav hatin

avêtin ku ji nerînen cuda re perestgehên ji hev cuda hatin vekirin. Li cem van xebatan perestgehên wan jî hatin temîrkirin. Ji bo weqfên hin cimaetan rêya xwedîbûna milkan hate vekirin. Ji bo rojnameyên kêmnetewan rêya weşandina reklamên fermî hate vekirin. Sînorên qedexeya derketina derwelêt hate kêmkirin, parastina agahî û daneyên şexsî hat kete bin kontrola qanûnê. Xala 301.ya Qanûna Cezaya Tirk (TCK) hat guherandin û bi vê sepandinê re destpêkirina lêpirsînê bi destûra Wezîrê Dadê ve hat girêdan û sînorên jor yên cezayê hatin kêmkirin.

“Protokola Îxtiyarî Ya Pêvek Ya Ji Peymana Neteweyên Yekbûyî Ya Li Hember Ceza Yan Jî Kirdariya Biçûkxistî Yan Jî Dermirovahî, Zalimtiyên Din û Îşkenceyê Re» û “Peymana Konseya Ewropayê Ya Derbarê Rêlibergirtina Terorîzmê” hate pejirandin. Girtîgehên ku ne li gorî standardên Neteweyên Yekbuyî û Konseya Ewropayê ne hatin girtin. Ji gîrtiyan re mafê tevlîbûna cenazeyên xizm û nasên wan re hate dayîn ku her wiha di nexweşiyeke giran de jî mafê ziyaretkirinê hate dayîn. Di saziyên Hîndekarîyên taybet de ji bo xwendekarên biyanî re jî mafê Hîndekarîyê hate dayîn. Mafên jinan hatin xurtkirin. “Qanûna Derbarê Rêlibergirtina Şîdeta Li Hember Jinan û Parastina Malbatê” kete Merîyetê. “Peymana Konseya Ewropayê Ya Derbarê Têkoşîna Li Hember Rêlibergirtina Şîdetê Nav Malbatê û Şîdeta Li Hember Jinan” û “Peymana Konseya Ewropayê Ya Di Mijara Parastina Îstîsmarkirin û Metîna Zayendî Ya Zarokan”

Şoreşa Bêdeng

70

hate pejirandin. Di vê çarçoveyê de ji bo pêşîlêbirîna îstîsmarkirina zarokan û xwedîlêderketin û tedawiya zarokên ku rastî destdirêjiyê hatine Lijneya Nirxandin û Çavdêriya Mafên Zarokan û Navendên

Çavdêriya Zarokan hatin avakirin.
Di beşa envanter ya pirtûkê de ji pêngavên sereke yên ku wek hurgilî û kronolojîk hatine rêzkirin li jêrê hatine vegotin:
Politîkaya Ji Îşkencê Re Sifir Tolerans
Ji pirsgirêkên ku di heyamên berê de Tirkiyeyê herî zêde xistiye tengasîyê yek jî lêkolînnekirina îdiayên derbarê îşkenceyê û tadê de bûn û di heman demê de cezayên ku ji ber van sûcan dihatin dayîn an kêmbûn an jî dihatin taloqkirin. Ji ber ku dewletê li dijî tade û îşkenceyê bi rêbazeke rast têkoşînek bi bandor nedida bawerîya gel ji dewletê her ku diçû kêmtir dibû. Di salên 1990an de navê Tirkîyeyê timî bi îddayên tade û îşkenceyê dihat bilêvkirin. Ji ber bûyerên ku nedihatin lêkolînkirin û cezakirin, Tirkiye ji aliyê Dadgeha Mafên Mirovan ya Ewropayê (AİHM) ve dihat mehkum kirin. Bi ser de di wan salan de gelê me wek mexdûr an jî gilîdar ji tirsê nedikarî serî li cihên berpirsîyar yên ewlehiyê bide. Ji aliyê din li qereqolan pirsgirêkên paqijiyê û birêkûpêkbûna hawirdorî jî hebûn.
Tirkîye di mijara mafên mirovan de, di heyamên berê de di têkoşina li hember îşkenceyê de li paş ma bû. Lê niha di têkoşîna li dijî îşkenceyê de hatiye asteke baş. Hikumetên 10 salên dawî di vê mijarê de pir hesas xebitîn û bi sepandina “ji îşkencê re sifir tolerans” pêngavên pir girîng avêtin.
Di vê çarçoveyê de perwerdehî û gîhandina peywiradên zeptî bi awayekî girîng hate kirin û her wiha perwerdehîya mafên mirovan jî zêdetir derket pêş. Di vê çerçoveyê de di bin banê Wezareta Karên Hundir de Navenda Nirxandin û Lêkolîna Binpêkirina Mafên Mirovan ya Cendermeyê hate avakirin. Ji bilî vê di sala 2002yan de di çarçoveya Pakêta Hevsaziyê ya Yekîtîya Ewropayê ya Duyemîn 2002-2012

de verastkirinek hate kirin û li gor vê verastkirinê biryar hate dayîn ku pereyên tazmînatê ku ji ber biryarên cezayê yên AİHMê hatibûn dayîn, bila ji aliyê personelên berpirsîyar ve bê dayîn.
Bi Qanûna Cezayê ya nû ku di sala 2005an de ket merîyetê cezayên ku ji ber tade û îşkenceyê hatibûn dayîn êdî nayên taloqkirin an jî ev ceza êdî nayên betalkirin. Ev pêngav ji bo tirsandin û rêlibergirtina îşkenceyê pêngavên erênî ne. Di vê çarçoveyê de di deh salên dawîn de, bi Komîteya Rêlibergirtina Îşkencê ya Ewropayê re bi awayekî hevpar xebat jî hate meşandin û di encama vê xebatê de şert û mercên girtîgehan li gor xwesteka Komîteyê ji nûve hatin serrastkirin. Ji bilî vê pêngavê Protokola Îxtîyarî Ya Pêvek ya Peymana NYyê ya Li Dijî İşkencê hate erêkirin. Her wiha di rêya rêlibergirtina tade û îşkenceyê de pêngavek din ya girîng jî hate avêtin.
Ji alîyê din ve çavdêrxane û li navendên ku esker û polîs li wir wezîfeyê dikin di warên fîzikî û teknolojîk de guhertinên mezin pêk hatin. Navendên polês û qereqol ku ji bo welatîyan cihên herî nêz an jî yekemîn yên serîlêdanê ne li gor standardên mafên mirovan jinûve hatin dîzayn kirin.
Dawîkirina Bûyerên Kuştinên Kiryar Nedîyar
Di salên 1990an de li Tirkîyeyê bûyerên kuştinên kiryar nedîyar pir zêde bûn. Hêlen tarî ku dixwestin li welêt alozî û tevlîheviyê derxin, ev kuştinên kiryar nedîyar ji bo ku bigihêjin armancên xwe yên kirêt bikar dianîn.
Bi pêngavên ku di çarçoveya demokratîkbûn û berfirehkirina mafên mirovan de hatin avêtin ve bûyerên wek înfazên bê dad û kuştinên kiryar nedîyar ji rojeva welêt êdî hatin derxistin. Wezîfedarên gelemperîyê ku tevlî van bûyeran bûne jî sewqî hêlên berpirsîyar

hatin kirin, derheqê wan de pêvajoya qanûnî dest pê kir. Her wiha di rêya ronîkirina bûyerên tarî û cezadayîna kujeran de pêşketinên mezin pêk hatin.

Şoreşa Bêdeng

72

Ji Rojeva Welêt Derxistina Mafya û Çeteyan

Berîya sala 2002yan Tirkiye wek dewleteke ku rêxistinên sûc yên organîze yên wek çete û mafya bi awayekî xurt feliyetên xwe birêve dibirin bû. Ji ber ku di wan heyaman de li Tirkiyeyê di warên aborî, civakî û teknolojîyê de guhertin pek hatin û ji ber vê di rêvebirtî û sîyasetê de qadên bê kontrol zêde bûn, bê îstîqrariya aboriyê hebû em dikarin tesîra zêdebûna çete û mafyayê bi van yekan vebêjin. Beriya sala 2002yan li Tîrkiyeyê sûcên wek kuştin, birîndarkirin, revandina mirovan, qeçexçîtiya madeyên tîryakê, qeçexçîtiya çekan, qeçexçîtiya mirovan, tahsîlata çek û senedan, standina xereç û fidyeyê bi zorê îmzekirina senedan û firotina jinan, sextekariya ewraqên bi nirx, talankirina ereziyên gelemperîyê di bin kontrola çete û mafyayê de bûn. Ji ber vê rewşê di civakê de tevlîhevî çêdibû, rêvebirîyên gelemperîyê yên devertî û navendî lewaz dibûn, pergala dadî ya cezayê bê bandor dima, bêrêtî belav dibû û herî zêde ji daraz, bîrokrasiya ewlehiyê û otorîteya siyasî re bawerî her diçû kêm dibû. Di navbera salên 2002 û 2012an de, di têkoşîna li dijî rêxistinên sûc û mafyayê de bi sepandina polîtîkayên ewlehiyê pêngavên pir girîng hatin avêtin, di vê heyamê de li dijî rexistinên sûc û mafyayê operasyonên baş hatin lidarxistin. Di encama van operasyonan de hema bêje hemû rêxistinên sûcê hatin rûxandin. Ev operasyon di bin navên cur bi cur de hatin kirin. Bi saya pêşketinên aborî- civakî, îstîqrar û van operasyonan, rêxistinên sûc yên wek mafya çete ji

rojeva Tirkiyeyê hatin derxistin.

Rakirina Cezayê Mirinê

Di kirdariyên cezayan de armanc ev e ku sûcdar piştî ku bê islahkirin jinûve vegerin nav civakê. Cezayê mirinê ku ji sala 1984an pê ve li welatê me nedihat sepandin, di sala 2002yan de li gor Protokola Bi 6 Nomre ya Pêvek ya Peymana Mafên Mirovan ya Ewropayê û bi verastkirina di 3. Pakêta Ahengsaziya Yekîtiya Ewropayê "bilî sûcên terorê û talûkeya şer yan jî nêzî şer" hate rakirin. Piştre di çarçoveya 7.Pakêta Ahengsaziya Yekîtiya Ewropayê ya bi dîroka 2003yan de 2002-2012

73

Protokola Bi 6 Nomre ya Pêvek ya Peymana Mafên Mirovan ya Ewropayê ya derbarê rakirina cezayê mirinê hat erêkirin. Di sala 2004an de jî bi 8. Pakêta Hevsaziyê ya Yekîtîya Ewropayê (YE) hate derxistin. Ji bo ku cezayê kuştinê ji makezagonê bi temamî bê derxistin di hemû xalên têkîldar de guhertin hatin kirin.

Di çarçevoya pêvajoya ku hêj dom dike de ji bo ku mewzûeta cezayê kuştinê li gor standardên Ewropayê bê dîzaynkirin, gelek peymanên girîng hatin mohrkirin. Di vê çarçoveyê de Protokola Îxtîyarî ya Yekemîn Pêvek ya Peymana Navneteweyî ya Derbarê Mafên Şaristanî û Siyasî ya NY yê û 2. Protokola Pêvek ya ku aramanc dikir cezayê mirinê rabe hat erêkirin. Kirdariyên Protokola Bi Hejmara 13. ya ku cezayê kuştinê di hemû şertan de bi temamî radike jî di Sibata sala 2006an de hate qedandin û protokola navborî li welatê me ket Merîyetê. Ji mewzûatan derxistina cezayê mirinê, di hiqûqa me de nêrîna ku sûcdar piştî ku hate islahkirin car din tevlî civakê bibe hêzdar kir. Dîsa sûc çiqas mezin be jî rayeya kuştinê nedayîna destê dewletê rûdaneke girîng e. Bi vî awayî Tirkiye teahûdekê xwe ya din

ya ahengsaziya Yekîtiya Ewropayê bi cih anî.
Li Gor Biryarên Dadgeha Mafên Mirovan Ya Ewropayê
Vekirina Rêya Nûkirina Darizandinê
Heta sala 2002yan biryarên binpêkirinê yên ku Dadgeha Mafên Mirovan ya Ewropayê (AİHM) derbarê Tirkiyeyê de dabû, di hiqûqa navxweyî de wek sedemeke nûkirina darizandinê nedihat dîtin. Ji ber binpêkirina mafên mirovan AİHMê ji Tirkiyeyê re cezayê tazmînatê dida, lê derbarê kesên têkîldar de biryareke nû nedihat girtin, ji ber vê sedemê jî mexdûrîyet tam safî nedibûn.
Di vê çarçoveyê de cara ewil di sala 2002yan de li gor 3. Pakêta Hevsaziya YE yê, biryarên binpêkirinê yên ku AİHMê li dijî Tirkiyeyê didan, di dozên hiqûq û cezayan de wek sedema jinûve darizandinê hat qebûlkirin. Piştre di sala 2003yan de jî ev verastkirina navborî wek girtina dozên îdarî jî hat berfirehkirin. Her wiha di mewzuata me de Şoreşa Bêdeng

êdî biryarên îxlalê yên ku AİHMê li dijî Tirkîyê li gor hukmên Qanûna Dadrêsiya Ceza, Qanûna Dadrêsiya Ûsila Hiqûq û Qanûna Ûsila Darizandinê bûn wek sedema jinûve darizandinê hatin pejirandin.
Li Hember Hiqûqa Navxweyî Qebûlkirina Serdestiya
Girêbestên Navneteweyî Yên Derbarê Mafên Bingehîn De
Yek ji pirsgirêka girîng ya ku Tirkiye rû bi rû bû, ji âliyê dezgehên darazê ve li gor girîngiya wan guhnedayîna peymanên mafên mirovan yên ku ev peyman ji aliyê Tirkîyeyê ve jî hatibû pejirandin bû. Di ser de hukmên hiqûqa navxweyî jî bi awayekî sînordarkirina azadiyan dihat şîrove kirin.
Di warê parastin û pêşxistina mafên mirovan de pêşketinek din jî, bi guhertina xala 90. ya Makezagona 1982yan ya sala di 2004an de

hat kirin pêk hat. Di vê çerçoveyê de heke peymanên derbarê mafên mirovan de peymanên navneteweyî û qanûnên navxweyî hukmên ji hev cudatir bihewînin ji bo çareserkirina lihevnehatinê wê demê dê hukmên biryarên peymanên neteweyînavneteweyî bên esas girtin. Bi vê guhertinê re dîyarîyên di mijara nirxên normatîf yên girêbestên derbarê azadî û mafên bingehîn de derdiketin holê jî, ji holê hatin rakirin. Ger dezgehên darazê vê serastkirinê têxin Merîyetê, wî çaxî verastkirin û sepandinên li dijî mafên mirovan, di hiqûqa navxweyî de bê hewcehiya destwerdana parastina qanûnê bi awayekî lezgîn û hêsan tê çareserkirin.

Pejirandina Mafê Wergirtina Agahiyê

Heta heyamên nêz jî di rêvebiriya gelemperîyê ya Tirkîyeyê de, nêrîna sirra dewletê û nepeniya kevneşopî serdest bû. Di sepandinên fermî yên dewletê de li ser gelek kirdariyan bi hinceta “hikmeta hikumetê” û “sirra dewletê” dihat nixûmandin. Ji ber ve yekê jî şexsan nedikarîbûn ku derbarê xwe yan jî berjewendiyên dewletê de bi awayekî rasterast an jî ne rasterast têkîldarin, ji dezgehên gelemperîyê agahiyan werbigirin.

2002-2012

75

Mafê wergirtina agahiyê ku ji bo hêzdarbûna rêvebiriyên demokratîk gelek girînge, di sala 2003yan de ket mewzûata Tirkiyeyê. Bi vê sepandinê di hemû sazî û dezgehên dewletê û saziyên pîşeyî yên di wesfa saziyên gelemperîyê de ne, li gor şertên wekhevî, bêalî û zelalî yê mafê bidestxistina agahiyê hate pejirandin û li gor vê verastkirin hatin kirin. Di vê çarçoveyê de heke kesek ji bo agahiyek serî li dezgehekê bide ew dezgeh mecbûre ku agahiyê bide wî/wê kesî. Her wiha ji bo ku îtirazên derbarê mijarê de zûtir werin bi encam

kirin Lijneya Nirxandin û Wergirtinê ya Agahiyê hate avakirin. Mafê wergirtina agahiyê bi guhertina Makezagonî ya sala 2010an têket bin ewlehiyê. Bi van sepandinan hat armanckirin ku rêvebirî li hember daxwazên welatîyan bê deng, xemsar nemînin.

Li Gor Peymana Mafên Mirovan Ya Ewropayê Pêkanîna Azadiya Rêxistinbûnê

Qanûna Komeleyan ya berê ku piştî derbeya 12 Îlonê hatibû çêkirin civaka bi rêxistin wek "talûkeyek"ê didît û hewl dida ku li bin kontrolê bigire. Bi armancên rêvebirineke demokratîk bicih bibe, berfirehkirina qada civaka Sivîl û xurtkirina azadiya birêxistinbûnê ve, di sala 2004an de Qanûna Komeleyan kete Merîyetê. Him bi vê guhertinê him jî bi guhertinên din qedexeyên li ser mafên birêxistinbûnê hatin rakirinku li gor rê û rêbazên Peymana Mafên Mirovan ya Ewropayê azadiya rêxistibûnê hate pêkanîn. Di vê çarçoveyê de sînordarkirin û qedexeyên li ber demezrîner û zimanên ku dê di kiryarên Komeleyan de bên bikaranîn jî hatin rakirin. Di damezrandina komeleyan de ji sîstema destûre derbasî sîstema ragihandinê bûn. Her wiha astengîyên li ber peywîrdarên gelemperîyê û xwendekarxwendekaran ku rê nedidan bibin endamên komeleyan jî hatin rakirin. Kesên li dijî qedexeyên qanûnê tevbigerin jî şûna cezayê girtîgehê dê bi cezayê pere werin cezakirin.

Di sala 2012an de jî "Qanûna Peymana Karên Komî û Sendiqayan" ya ku têkiliyên navbera kardêr û karkeran bi nêrîneke nû bi dest digirt hat derxistin. Di verastkirina ûsil û esasên derbarê rêxistinbûn,

xebat, venêrîn, xebitîn, rêvebirtî, damezirandina konfederasyon û sendîqayên karker û kardêran dihewîne de; ev hukmên karker û

kardêr wek hembertî dîyarkirina rewşên civakî û aborî û şertên aborî peymana kar ya komî bikin, lihevnekirinên xwe bi rêyên aştiyane çareser bikin û serî li lokavt û grevê bikin cih digirin.

Berfirehkirina Derfeta Bikaranîna Mafên Çalakî û Xwepêşandanê

Di demên berê de di bin navê Qanûna Meşa Xwepêşandan û Çalakîyê de, xwepêşandan û çalakî bi awayekî hêsan û keyfî dihatin qedexekirin.

Di qanûna navborî de hin guhertin hatin kirin. Her wiha ji bo ku mafên xwepêşandan û çalakîyên aştiyane hêzdar bin û rûnên, ji bo bingeheke demokratîk hin pêngav hatin avêtin. Di vê çerçoveyê de dema taloqkirina xwepêşandan û çalakiyan hate kêmkirin. Cezayên di derbarê kirdariyên qedexe de jî jinûve hatin sererastkirin. Bi vî awayî astengîyên li ber kesên biyanî ku dixwazin beşdarî xwepêşandan û çalakiyan bibin jî hatin hêsankirin. Di vê çarçoveyê de ji bo mafê bikaranîna lidarxistina meşa xwepêşandanê û çalakiyê bi tenê “şerta ji 18 salî mezintir û xwedîbûna ehliyeta fiîlî” wek şerta têr hate pejirandin.

Ji Bo Weqfên Cemaetên Hindike Hêsankirina Bidestxistina Milk û Firehkirina Qadên Azadiya Wan

Li welatê me ji
ber sepandinên li
dijî demokrasîyê
xwe qutkirina ji
derve û wek beşên
din yên civakê
weqfên cemaetan
jî bandorên neyînî
girtine. Bi van

Li welatê me ji ber sepandinên li
dijî demokrasîyê xwe qutkirina ji
derve û wek beşên din yên civakê
weqfên cemaetan jî bandorên
neyînî girtine. Bi van sepandinan
mafê azadîya olî û mafê
xwedîbûna milk ya cemaetan
hatiye tengkirin.
2002-2012
77
sepandinan mafê azadîya olî û mafê xwedîbûna milk ya cemaetan hatiye tengkirin.
Di vê çerçoveya çareserkirina van pirsgirêkan de bi guherînên di Qanûna Weqfan û rêziknameyên têkîldar de, ji bo wekfên aîdê cemaetan, hindike bikaribin mal û milkên xeyrî menqûl bistînin û bikaribin li ser wan teserûfan bikin pêngavên erênî û hêsankirinên girîng hatin avêtin. Ji bo ev malên xeyrî menqûl li ser navên veqfan werin tescîlkirin şerta destûra Lijneya Wezîran hatîye rakirin û wextê seridandina tescîlkirina malên xeyrî menqûl yên di bin teserûfa veqfên cemaetan de ne jî ji 6 mehan ji bo 18 mehan hatîye derxistin. Di sala 2008an de jî bi Qanûna Weqfan ve gelek milkên xeyrî menqûl piştî serîlêdanan li ser navê weqfên cemaetan hatin qeyd kirin.3
Ji bo ku mafên perwerdehiyê yên welatîyên me yên baweriyên wan cuda bên pêşxistin ji aliyê Wezareta Perwerdehiya Netewî ve pirtûkên Ermenîkî hatin amadekirin û heyama perwerdehiyê ya sala 2010-2011an li dibistanên Ermeniyan bê pere hatin belav kirin.
Ji bilî van xebatan bi Biryara Lijneya Giştî ya Saziya Îlan û Çapemeniyê re, rê li ber weşandina reklamên fermî ya li rojnameyên hindike

3 Li gor Madeya 7. a Qanûna Weqfan ya Demkî ya ku derbarê milkiyetê de ye û di
2008î de kete merîyetê, 181 milk li ser serlêdana weqfên cemaetê li ser navên wan
hatin qeykirin. Sêwîxaneya Rûm a Büyükadayê di 29ê Mijdara 2010î de li gor biryarên
Dadgeha Mafên Mirovan ya Ewropayê dewrê Patrikxaneya Fener Rumê hat
kirin. Ji aliyê ve din di 27ê Tebaxa 2011yê de, madeyek nû hat xistin nav naveroka
Qanûna Weqfan. Her wiha ji bo îadekirina milkên komên bawerîcûda ku berê ji
ber hin sedeman hatibû zeptkirin rê hat vekirin. Di 1ê Cotmeha 2011yê de ji bo
sepandina madeya 11. ya Demkî rêznameyek hat weşandin û serîlêdanên îadekirina
milkên xeyrî menqûl yên weqfên cemaetan heta 27ê Tebaxa 2012yê hat dirêjkirin.
Di vê çerçoveyê de bi tevahî ji 160 weqfên cemaetan 1560 serîlêdanên ji bo milkên
xeyrî menqûl kirin. Piştî nirxandinên Meclisa Weqfan 111 milkên xeyrî menqûl li
ser navên weqfên têkîldar hatin tescîlkirin. Ji bo 15 milkên xeyrî menqûl jî dayîna
tezmînatê ji weqfên têkildar re biryar hat dayîn. Nirxandinên derbarê 1220 milkên
xeyrî menqûl jî didomin. Piştî ku Qanûna Weqfan kete merîyetê 17 milkên xeyrî

menqûl ku di wesfa dibistanê de bûn, gihîşt wesfa milkên hatinî tîne. Ji bilî ve
madeya 11. Ji aliye Meclisa Weqfan a Midûriyeta Gişti a Weqfan ve, ji bo Cemaeta
Mûsevî a Îzmîr statuya“Wekfa Cimaeta Mûsevî a Îzmîr”, ji bo Lîseya Surp Haç
Tibrevank statûya “Weqfa Lîseya Surp Haç Tibrevank”, ji bo Dibistana Keç a Rûm a
Navend a Beyoğluyê statûya “Weqfa Dibistana K eç a Rûm a Navend a Beyoğlu”yê
hat dayin.
Şoreşa Bêdeng
78
hate vekirin. Ev pêşketin ji bo ku aborîya rojnameyên hindike bê xurtkirin pêngavek pir girîng e. Bi saya van pêngavan piştî 50 salan di 4ê Tebaxa 2012an de weşanxaneyeke Rûman jî dest bi çapê kir.
Dayîna Mafê Serlêdana Şexsî Ji Bo Makezagonê
Bi guherîna Makezagonî ya ku di sala 2010an de hat kirin ve, dayîna serîlêdana şexsî ya ji bo Dadgeha Makezagonê, li cem pêkanîna lêgerîna mafan di hiqûqa navxweyî de, wekî tevdîreke astengkirina kêmkirina serîlêdanên ji Tirkiyeyê li AHİMê têne kirin hate fikirîn. Dema ku mirov li kataloga derbarê pêgeha mafên serîlêdanên şexsî de binêre dikare vê
rastiyê bi awayekî
eşkere bîne ziman.
Piştî guherîna di
sala 2010an de di
Makezagonê de ev

hukim cih digire,
“Hemû kes dikare,
azadî û mafên
bingehîn yên di
Makezagonê de hatiye ewlehî kirin, ji aliyê hêzeke gelemperî ve ya di çarçoveya Peymana Mafên Mirovan ya Ewropayê de ye, bi hinceta binpêkirina mafê xwe, serî li Dadgeha Makezagonê bide. (m.148/3)
Piştre bi serastkirinên jêr yên din û qanûnî ve ji dîroka 23yê Îlona 2012yan pê ve ev rê bi awayekî fîîlî vebû.
Em dikarin mafê serîlêdana şexsî, wek neynika wijdana mirovan bibînin. Bi saya vê pêngavê êdî hemû kesên ku difikirin hatine mexdûrkirin ji bo bidestxistina mafên xwe û mexdûriyeta xwe ji holê rake piştî qedandina rêyên qanûnî dikarin bi hêsanî serî li Dadgeha Makezagonê bidin.
Em dikarin mafê serîlêdana şexsî,
wek neynika wijdana mirovan
bibînin. Bi saya vê pêngavê êdî
hemû kesên ku difikirin hatine
mexdûrkirin ji bo bidestxistina
mafên xwe û mexdûriyeta xwe ji
holê rake piştî qedandina rêyên
qanûnî dikarin bi hêsanî serî li
Dadgeha Makezagonê bidin.
2002-2012
79
Rakirina Tengbûnên Venêrîna Darazê
Ji bo pêkanîna dewleta hiqûqê di asta makezagonî de, li Tirkiyeyê pirsgirêka herî mezin ev e ku, hatiye pêşbînî kirin ku ji ber hin

sînordarkirinên venêrîna darazî yên ku astengî li ber bikaranîna mafên bingehîn yên şexsî derdixistin hatin rakirin û berjewendiyên şexsî li hember dezgehên hiqûqê hatin parastin. Ji ber vê gelek mexdûriyet derketin holê. Pirsgirêka mezin ew bû ku ev tişt ji jêderiya makezagonê derdiket. Bi taybetî endamên saziyên adlî û eskerî ji bo mafên xwe yen şexsî nedikarîn li hember şertên pîşeyî serî li darazê bidin û ji ber nebûna derfeta serîlêdanên mafên xwebûnî serastkirin pêk hatin. Lê bi guhertina ku di sala 2010an de di Makezagonê de hate kirin ve di vî warî de pêngavên pir girîng hatin avêtin. Di vê çerçoveyê de li hember bilî biryarên terfi û teqawîtbûna ji ber nebûna kadroyê, biryarên ji pêwendî birînê yên Şûreya Eskerî ya Bilind (YAŞ) û li hember biryara ji pîşeyê derxistinê ya Lijneya Bilind ya Dozger û Dadgeran (HSYK) rêya darazê hate vekirin. Li cem vê jî li hember cezayên şermezarkirinê û hişyarkirina karmendan jî derfeta serîlêdana rêya darazê hate vekirin.

Biewletirkirina Parlementertî û Partiyên Sîyasî

Li Tirkiyeyê bi tenê di salên 1990an de ji ber sedemên dibenabe nêzî 20 partiyên siyasî bi biryarên Dadgeha Makezagonê hatin girtin û welat kete nav rewşeke wisa ku wek gora partiyên siyasî dixuya. Partiyên siyasî yên ji ûnsirên bivênevê yên demokrasiyê ne, ewqas hêsan dihatin girtin, li hember bi sazîbûna demokrasiya me ji nav astengîyan astengîyeke pir girîng bû. Di çarçoveya 2. Pakêta Ahengsaziya Yekîtiya Ewropayê de, di sala 2002yan de hat derxistin de, di Qanûna Partiyên Siyasî de guherîn hatin kirin; li şûna alternatîfa girtina partiyan alternatîfa, “kêmkirina alîkariya dewletê yan jî ji alîkariya dewletê bêparxistin” hat pêkanîn. Ji aliyê din ve ji bo dijwarkirina girtina partiyên siyasî “şerta navendbûnê” hate danîn.

Şoreşa Bêdeng
80
Bi guherîna Makezagonî ya sala 2010an, di warê azadiya partiyên siyasî de du nûtiyên girîng hatin pêkanîn. Pêngava ewil, parlementerê ku bûye sedema girtina partiya xwe dê ji parlamenteriyê neyê derxistin. Pêngava duyemin jî şert hate danîn ku divê Dadgeha Makezagonê ji bo dayîna biryara girtina partiyên siyasî yan jî ji alîkariya dewletê bêpar hîştinê, ji dengên ji sisiyan didu dengê piranî (oy çokluğu) yên endamên ku beşdarî civînê bûne bistîne.
Lê berê piranî ji pêncî sisê bû ku derket ji siseyan diduyan, ev jî ji bo azadiya partiyên siyasî rewşeke hêj bi ewle derxist holê. Bi taybetî dema ku were fikirîn, Dadgeha Makezagonê gelek caran derbarê partiyên siyasî de biryara sepandinên tengavkirinê da, girîngiya vê pêngavê ji bo partiyên siyasî dê hê baştir were fêmkirin.
Sazkirina Lijneya Venêrîna Gel

Di demokrasîyên îroyîn de ji bo ku şexs û mafê şexsan li hemberî dewlete bê parastin û hildin bin ewlehiyê sepandinek girîng jî sepandina "Venêrîna Gel" e. Di vê çarçoveyê de di sala 2006an de qanûnek hate derxistin û wek girêdayê Meclîsa Gel ya Mezin ya Tirkiyeyê (TBMM) "Saziya Venêrîna Gel" hat sazkirin. Lê belê qanûna navborî bi hinceta ku dijî xala 87.ya Makezagonê ya rayeyên TBMMyê dide rêzê ye,
Bi guherîna Makezagonî ya
sala 2010an, di warê azadiya
partiyên siyasî de du nûtiyên
girîng hatin pêkanîn. Pêngava
ewil, parlementerê ku bûye
sedema girtina partiya xwe
dê ji parlamenteriyê neyê
derxistin. Pêngava duyemin jî
şert hate danîn ku divê Dadgeha
Makezagonê ji bo dayîna biryara
girtina partiyên siyasî yan jî ji
alîkariya dewletê bêpar hîştinê,
ji dengên ji sisiyan didu dengê
piranî (oy çokluğu) yên endamên
ku beşdarî civînê bûne bistîne.
2002-2012
81
ji aliyê Dadgeha
Makezagonê hate
betalkirin. Piştî vê
rûdanê, bi guhertina
makezagonî ya sala

2010an ve sernivîsa
pêvek a xala 74. hat
serastkirin û “Mafê
Serîlêdana Venêrîna
Gel” hate pêkanîn. Di
vê çerçoveya dewleta
hiqûqê û parastina
mafên mirovan de,
Saziya Venerîna Gel
hate sazkirin. Ji 29ê Adara 2013yan pê ve, jî serî li lijneyê tê dayîn.
Li demokrasiyên pêşketî yên welatên rojava, “Saziya Vênêrîna Gel” bi pêkanîna mekanîzmaya gilî ya bi çalak û serbixwe, di karkirinên xizmetên gelemperîyê de, hemû cure kirdariyên rêvebirinê, tevger û helwestan li gor hiqûq û heqaniyetê lêkolîn û vekolînan dikin ûteklîfa tînîn rojevê. “Saziya Venêrîna Gel” jî ji bi heman awayî wek girêdayê Serokatiya Meclîsê feeliyetên xwe didomîne.
Sazkirina Lijneya Mafên Mirovan Ya Tirkiyeyê
Di rêwîtîya demokrasîya pêşketî de, ji bo ku mafên mirovan bên birêkûpêk kirin û bingheke zexm were danîn hewcedariya welatê me bi saziyeke azad û xwedî rayayên berfireh ya mafên mirovan hebû. Di arasteyî vê daxwazê de, ji bo pêşxistin û parastina mafên mirovan xebatan bike di sala 2012an de Saziya Mafên Mirovan ya Tirkiyeyê hate sazkirin. Ji parastin û pêşxistina mafên mirovan bigire heta têkoşîna li dijî tade û îşkenceyê, ji lêpirsîna gilî û serîlêdanan bigire, heta safîkirina pirsgirêkan, ji şopandina pêşketinên di perwerdehiyê de û heta teqîbkirin û nirxandina rûdanên qada mafên mirovan ev sazî hatiye bi rayekirin.
Li demokrasiyên pêşketî yên

welatên rojava, “Saziya Vênêrîna Gel” bi pêkanîna mekanîzmaya gilî ya bi çalak û serbixwe, di karkirinên xizmetên gelemperîyê de, hemû cure kirdariyên rêvebirinê, tevger û helwestan li gor hiqûq û heqaniyetê lêkolîn û vekolînan dikin ûteklîfa tînîn rojevê. “Saziya Venêrîna Gel” jî ji bi heman awayî wek girêdayê Serokatiya Meclîsê feeliyetên xwe didomîne.

Şoreşa Bêdeng

82

Beriya Saziya Mafên Mirovan ya Tirkiyeyê, bi girêdayî Serokwezîrtîyê Serokatîya Mafên Mirovan û li bajar û navçeyan jî Lijneyên Mafên Mirovan hebûn. Lê ev lijne û serokatî di warê şopandin û çareserkirina binpêkirinên mafên mirovan de heta astekê çalak bin jî erka xwe baştir nedianîn cîh. Lê êdî tê çaverekirin ku Saziya Mafên Mirovan ya Tirkiyeyê dê pêşerojê tevkariyek baş ji bo safîkirina pirsgirêkan bide.

Hêzdarkirina Mafên Zarokan

Li gor mewzûatên demboriyê yên di merîyetê de bûn, temenê zarokatiyê ne 18 wek 15 dihat qebûlkirin. Di ser de zarok ne li Dadgehên Zarokan, li Dadgeha Ewlehiya Dewletê (DGM) dihatin darizandin.

Li gor Peymana Mafên Zarokan ya Neteweyên Yekbûyî “yên ku ji 18 saliya xwe derneketine zarok têne hesibandin” hate qebûlkirin. Her wiha şerta rewşên îstîsna yên peywîra Dadgehên Zarokan hatin

rakirin, rê li ber hate girtin ku zarok bilî van dadgehan di dadgehên din de bên darizandin.
Bi guhertina ku di Qanûna Dadgeha Zarokan de hate kirin de biryar hate dayîn ku her bajarên ku nifûsa wan ji 100.000î zêdetir e, avakirina dadgehên zarokan bi hukmê ve hat girêdan. Ji bilî vê, hin zarokên ji 18 salî biçûktir yên ku di raya gişt î de wek “zarokên kevir diavêjin” têne zanîn, ji ber ku tevlî bûyerên tundî û terorê dibûn di pêgeha Qanûna Têkoşîna Li Dijî Terorê de, ne di dadgehên cezaya giran ya xwedî rayeya taybet de, derfet hate dayîn ku di dadgehên zarokan de werin darizandin.
Hêzdarkirina Mafên Jinan
Di mijarên wek mafên jinan, wekheviya jin û mêran û tundiya li dijî jinan de di serastkirinên mewzûatên me de kêmasî hebûn û ev kêmasî di heyamên nêz de zêdetir dihatin bilêvkirin.
Di deh salên dawî de mewzuatên derbarê mafên jinan de jinûve hatin serastkirin û bi hin guhertinên qanûnî di rêya wekhevîya jin û mêran
2002-2012
83
de, pêngavên girîng hatin avêtin. Di vê çarçoveyê de di sala 2003yan de li gor 6. Pakêta Ahengsaziya Yekîtîya Ewropayê, di Qanûna Cezayê ya Tirk de hin guhertin hate kirin. Her wiha cezayê sûcên kirdar ku “ji bo namûsê zarok kuştiye” hate girankirin û di rewşên wek “kuştinên toreyê” de madeyên ku di cezayê kirdar de daxistin pêk dianî ji merîyetê hatin rakirin. Dîsa di sala 2003yan de jî di nav Protokolên Pêvek Yên Peymana Neteweyên Yekbûyî Ya Li Hember Sûcên Bi Rêxistinî Yên Ji Sînor Derbas Dibin de “Protokola Derbarê Cezakirin, Rawestandin û Astengkirina Bi Taybetî Bazirganiya Zarok û Jinan” cih digirt, hat erêkirin.
Di çerçoveya guherînên ku di sala 2004an de di Makezagonê de

hatin kirin ve di xala 10. ya Makezagonê de verastkirin hate kirin û li gor vê Hukma “jin û mêr xwedî mafên wekhev in û stûbariya dewletê ev e ku vê wekheviyê derbasî jiyanê bike” bi hukmê ve hate girêdan. Piştre di sala 2010an de xalek lê hate zêdekirin ku li gor vê xalê “tevdîrên ku bi vê armancê têne girtin, nabe ku li dijî wekhevîyê werin şîrovekirin” Bi vî awayî cudaxwaziya pozîtîf ya ji bo jinan bi awayekî zelal hate vegotin.

Di çerçoveya hestiyarî û hesasiyeta di mijara libergirtina tundiya li dijî jinan de, di sala 2005an de, di bin banê Meclîsê (TBMM) de, bi armanca lêkolînê “Piştî Lêkolîna Sedemên Tundiya Li Dijî Zarok û Jinan û Kuştinên Namûs û Toreyê Dîyarkirina Tevdîrên Divê Bên Girtin” komîsyoneke lêkolînê hate damezirandin. Li gor rapora ku di encama xebatên komîsyonê de derketin holê, Giştînameya Serokwezîrtiyê ya bi mijara “Tevdîrên Ji Bo Libergirtina Tundiya Tevgerên Li Dijî Jin û Zarokan û Kuştinên Tore û Namûsê” kete merîyetê.

Di sala 2009an de “Qanûna Komîsyona Wekhevîya Fersendê ya Jin û Mêran” hat derxistin. Bi vê qanûnê parastin û geşkirina mafên jinan, di warê wekheviya jin û mêran de şopandina rûdanên ku li Tirkîyeyê û dinyayê diqewimin, derbarê van rûdanan de agahdarkirina Meclîsê (TBMM) û ger hewce bibe ji bo pêşniyar bide li Meclîsê (TBMM) “ Komîsyona Wekheviya Fersendê ya Jin û Mêran” hate damezirandin.

Şoreşa Bêdeng

84

Di sala 2012an de “Qanûna Parastina Malbatê û Libergirtina Tundîya Li Dijî Jinan” hate derxistin. Armanca vê qanûnê jin, zarok endamên malbatê an jî mexdûrên ku rastî tundiyê hatine an jî îxtîmal e ku rastî tundiyê bên, endamên malbatê yên ji ber teqîba israrî mexdûr in werin parastin û

di vê çerçoveyê de
esas û ûsila tevdîrên
ku dê bên girtin
dîyar bike ye. Ji aliyê
din ve bi guhertina
Qanûna Şaredarîyê
ve, şaredarî ji bo ku
xizmetê bidin jinên
rastî tundiyê bûne,
hatin wazîfedarkirin. Bi vê qanûnê ji şaredariya bajarên mezin yan jî şaredariyên ku nifûsa wan ji 50.000î derbas dibin re peywira, divê malên parastina jin û zarokan vekin, hatiye dayîn.
Tirkîye di amadehiyên “Peymana Konseya Ewropayê ya Derbarê Pêşîlêgirtina Tundiya Li Dijî Jinan û Tundiya Navmalê û Têkoşîna Bi Vê Tundiyê” de pêşengtî kir û ev Peyman bi dîroka 8ê Adara 2012an ve, di nav hemû welatan de herî ewil erê kir. Ev Peyman, tundiya fizîkî, cinsî, psîkolojîk, zewaca bi zorê û ji tundiyên din dinasîne û li ser van kirdarîyên cezayan tîne.
Zêdekirina Cezaya Bikaranîna Hêza Bêpîvan
Mexdûriyet û binpêkirinên mafên ku di bûyer û çalakiyan de, ji ber bikaranîna hêza bêpîvan ya ji aliyê hêzên ewlekariyê derdiketin holê û ji ber ku li ser libergirtina van binpêkirinan kirdariyên bi bandor tunebûn, ev mijar gelek caran serê Tirkiyeyê diêşand.
Bi Qanûna Cezayê ya Tirk ya bi hejmara 5237 ve ji bo berpirsîyarên gelemperîyê yên ku dema wezîfeya xwe pêk tînin li hemberî şexsan destwerdana bê pîvan dikin, sepandina Hukma sûca bi zanayî
Tirkîye di amadehiyên “Peymana
Konseya Ewropayê ya Derbarê

Pêşîlêgirtina Tundiya Li Dijî Jinan
û Tundiya Navmalê û Têkoşîna
Bi Vê Tundiyê” de pêşengtî kir û
ev Peyman bi dîroka 8ê Adara
2012an ve, di nav hemû welatan
de herî ewil erê kir.
2002-2012
85
birîndarkirin hate pêşbînî kirin. Her wiha cezayê vê sûcê ya ku bin sînorê wê 3 meh bû, hate zêdekirin.
Başkirin û Serastkirina Şertên Binçaviyê (Başkirina Mafên Gumanbaran)
Di heyamên berê yên welatê me de, îdiayên ku çavdêrxane him ji hêla fizîkî ve nebaş in û him jî li van deran mafên welatîyan têne binpêkirin derdiketin pêş, dibûn sedema gilîyên mafdar. Ji ber van gilî û gazinan di qadên nawneteweyî de encamên neyînî yên li dijî Tirkiyeyê derdiketin holê. Ji aliyekî ve jî ji ber van giliyan Tirkîye ji alîyê Dadgeha Mafên Mirovan ya Ewropayê (AİHM) ve dihate cezakirin.
Di sala 2005an de “Rêziknameya Girtin, Binçavkirin û Îfade Dayînê” ket Merîyetê. Li gor vê rêziknameyê ewlehiyên di warên maf û azadiyên bingehîn de yên wek rayeya binçavkirinê, agahdarkirina xizm û eqrebeyan û kirdariyên çavdêrxanê li gor azadî û mafên bingehîn jinûve hatin serastkirin. Her wiha di mijara maf û azadiyên mirovan de asta parastinê hat bilindkirin û mafên şexsî hatin çalakkirin. Ji bilî vê girtîgeh ji hêlên fizîkî ve hatin başkirin, odeyên îfadegirtinê jî li gor standardên mafên mirovan ji nûve hatin dîzayn kirin.
Girtina Girtîgehên Ku Ne Li Gor Standardên NY û

Konseya Ewropayê Ne
Di salên berê de piraniya girtîgehan him ji alîyê fizîkî ve him jî ji alîyê personelan ve ne li gor standardan bûn. Ev yek dibû sedema gilî û gazinên girtî û hukimxwaran û ji aliyek ve jî îsrafên personel û çavkaniyê zêde dikir. Di vê çarçoveyê de 208 girtîgehên ku ne li gorî standardên Konseya Ewropayê û NY yê bûn di deh salên dawîn de hatin girtin. Dîsa di heman heyamê de li gor standardên Ewropayê 68 girtîgehên bi 14509 kesî yên nû hatin vekirin. Di sala 2012an de jî 13 girtîgehên din yên nû hatin vekirin û 7 avahiyên pêvek hatin çêkirin.
Şoreşa Bêdeng
86
Ji Girtî û Hukimxariyan Re Dayîna Derfetên
Beşdarbûna Cenazeyê Xizmên Xwe û Di Rewşa
Nexweşiya Giran De Dayîna Derfeta Serîlêdanê
Ji ber ku girtî û hukimxar di nexwaşîyeke giran de nedikarîn herin serdana xizmên xwe yan jî di mirina wan de nikaribûn biçin cenazeyên wan, ji aliyê mirovahîyê ve mexdûriyetên mezin pêk dihatin.
Bi verastkirana ku sala 2012an hate kirin ve, ji bo ku girtî beşdarî cenazeyê hevser yan jî xizm û eqrebêyên xwe yê dereceya yekem û duyem bibin, ji bilî maweya rê, 2 roj ji bo serdana xizm û eqrebayên xwe yên nexweşên giran yên dereceya yekem jî, bilî maweya rê rojek destûr hat dayîn.
REFORMA DARAZÊ
2002-2012
89
REFORMA DARAZÊ
Di Makezagonên 1961 û 1982an de têgîhiştinek elîtîst serdest bû, daxwazên gel yên ku çavkaniya hîma serdestiyê ne di plana duyem de

dima û bawerîyeke wek, gel di daxwazên xwe de dibe ku xeletî bike hebû û di van rewşan de ev “xeletîyên” ku hatin kirin divê bên rastkirin, bi awayekî eşkere li holê bû. Nîşaneya herî şênber ya vê nêrînê, di daraza bilind de dihat xuyakirin. Endamên Dadgeha Makezagonê, Şûreya Dewletê, Dadgeha Bilind û Lijneya Dadger û Dozgeran a Bilind (HSYK) bi pergala girtî, ji kesên ku ji nav wan dihatin hilbijartin an jî ji aliyê Serokomar dihatin tayîn kirin. Serokomar jî ji aliyê TBMMê dihat hilbijartin. Parlamentoya Gel a Mezin a Tirkiyeyê (TBMM) ji hêla navendên antî-demokratîk ve di heyamên cuda de di bin zext û zordariyê de dima û mînakên vê zextê jî di dîroka nêz ya Tirkiyeyê de heye. Ev çerxa bêsûd ya ku ji piranîtiyê dûr û bi tenê ji bîrokrasiya darazê ya tayînkirî re vekirî bû, di heyama nêz de dibû sedema pirsgirêkan û ev jî tê zanîn. Girtina Partiyan, “Biryara 367” ya4
, Dadgeha Bingehîn,
gelek biryarên daraza bilind ya ku ji aliyê raya giştî ve wekî îdeolojîk û siyasî dihatin dîtin, ji van pirsgirêkan hinek in. Saziya olîgarşîk a ku bi pergala girtî dixebitî, darazê ji peşveçûn û guherîna civakî dûr xistiye û li paş standartên gerdûniyê hiştiye.”
Verastkirinên ku di referandûma 2010an de hatin qebûl kirin, di vî warî de gelekî girîng in. Bi saya van gûhertinan di warê daraza bilind

4 Ji aliyê Dadgeha Makezagonê pejirandina madeya 102emîn ya ku 2 tûrên ewil de ji
3 para dengan 2 par pêşdibîne û tê wateya 367 dengê derbarê hilbijartina Serokomar
ya di Makezagona 1982yan de.

de, pergalek demokratîktir pêk hat û bi taybetî li HSYK (Lijneya Bilind

A Dadger û Dozgeran) giraniya wesayeta daraza bilind, bidawî bû. Di vê çerçoveyê de; HSYK(Lijneya Bilind A Dadger û Dozgeran) hêj demokratîk bû û biryarên wê ji venêrîna darazê re hatin vekirin. Dadgeha Makezagonê jî hêj demokratîktir bû û gihîşt pergaleke piranîparêz. Bi armanca ku kar û barê darazê siviktir bibe û standartên darizandina bi dadî were pêşxistin, qanûna avakirina Dadgehên Îstînafê hat derxistin. Çarçoveya sepandina serbestîya bi kontrol hatiye firehkirin. Ji aliyê din Dadgehên Malbatê hatin damezrandin. Ji bo ku darizandin adîl û bilez bê kirin hin serastkirin hatin kirin. Azadiya çapemenî-weşan, azadiya îfadekirinê hate xurtkirin. Ji bo mafê ewlehî û azadiya kesayetiyê hêzdartir bibe, verastkirina "dadgera azadiyan" hate pêkanîn.

Ji pêngavên sereke yên ku di beşa envanter ya pirtûkê de bi awayek kronolojîk û hurgilî hatine rêzkirin li jêr hatine vegotin:

Demokratîkkirina Binesaziya Lijneya Bilind Ya Dadger û Dozgeran

Lijneya Bilind a Dozger û Dadgeran (HSYK), dozger û dadgerên ku di dadgehên dereceya ewil de dixebitin, ji qebûlkirina wezîfeyê heta teqawîtiyê, di mijarên mafên xwebûna wan de, lijneya tekane xwedî raye bû. Ji bilî vê lijneyê, ji çar parên nûnerên Dadgeha Bilind û Şûreya Dewletê sê par hildibijrat û di pêkhatiyên daraza bilind de hema bêje tenê ew lijne desthilatdar bû. HSYK (Lijneya Bilind A Dadger û Dozgeran) ji ber van rayeyên xwe yên bihêz, di pevajoya darazê de gelek caran hatiye behskirin. Bi taybetî di van salên dawî de HSYK ji ber hin dozên krîtîk û destwerdana li van dozan, gelekî hat rexne kirin. Di encama vê yekê de bi gûhertina Makezagonî ya di sala 2010an de, pergela HSYKê bi aweyekî girîng hatiye guhertin. Berî gûhertina Makezagonî ya 2010an HSYK; ji Wezîrê Dadê,

Misteşarê Wezîrê Dadê, 3 endamên ku ji Dadgeha Bilind û 2
2002-2012
91
endamên ku ji Şûreya Dewletê dihatin bi tevahî ji 7 kesan pêk dihat û bi zêdehiya dengan biryar digirt. Lijneya ku di mijara mafên xwebûnê ya endamên daraza dereceya ewil a ku ji deh hezarî zêdetir kesan pêk tên di Lijneya xwedî rayeya biryargirtinê de nedihatin temsîl kirin ku ev jî kemasîyeke mezin bû. Ji xeynî Wezîrê Dadê û Misteşarê Wezîrtiyê, 5 endamên ku bi temamî ji daraza bilind dihatin dikaribûn bi awayekî blok tevbigerin û biryarên ku dixwestin ji Lijneyê derxin. Bi gûhertina sala 2010an hat pêşbînîkirin ku dê Lijne ji 22 endamên esîl û 12 endamên cihgir pêk were. Ji bilî heft endamên lijneyê yên heyî, 3 endam ji nav dozger û dadgerên ku li dadgehên dereceya ewil a daraza rêveberiyê, heft endam ji nav dadger û dozgerên ku li dadgehên dereceya ewil dixebitin, endamek ji nav endamên Akademîya Dadê a Tirkiyeyê û 4 endam jî ji aliyê Serokomar ve; ji nav parêzer û endamên hîndekar yên hiqûqnasan tên hilbijartin. Lijne bi binesaziya xwe ya nû, ji dozger û dadgerên ku li dadgehên dereceya ewil dixebitin re derfeta bi aweyekî dadwerî bên temsîl kirin aniye. Bi vî awayî Lijne, bi halê xwe yê nû, gihîştiye avabûnek bêtir demokratik, piralî û piranîparêz û nêzî lijneyên daraza bilind ên di mînakên

welatên Ewropa yê
bûye. Ji aliyê din
ve, ger Misteşarê
Wezareta Dadê beşdarî lijneyê nebe jî berdewamkirina xebatên
Lijneyê nûjenîyeke girîng e.
Tevî berdewamkirina wezîfeya serokatiya Lijneyê ya Wezîrê Dadê
beşdarnebûna xebatên daîreyê û ji bo ku Lijne gihîşt kesayetiya
cuda ya tuzel, personelên cuda, sekreterya, lijneya teftîşê û budçeyê,
Tevî van gûhertinên erênî di
avabûna HSYKê de kemasîyeke
girîng jî ew e ku di hilbijartinên
endamên lijneyê de ji Meclîsê re
hêj raye nehatiye dayîn. Lê li nav
welatên Ewropayê yên mînak, tu
dewletek tune ye ku ji lijneyên
wisa yên bilind re endam ji aliyê
parlamentoyê neyên hilbijartin.
Şoreşa Bêdeng
92
dawî li rexneyên mijara serbixwe ya Lijneyê hatiye dayîn. Tevî van gûhertinên erênî di avabûna HSYKê de kemasîyeke girîng jî ew e ku di hilbijartinên endamên lijneyê de ji Meclîsê re hêj raye nehatiye dayîn. Lê li nav welatên Ewropayê yên mînak, tu dewletek tune ye ku ji lijneyên wisa yên bilind re endam ji aliyê parlamentoyê neyên hilbijartin.
Demokratîkkirin û Piranîparêzkirina Binesaziya
Dadgeha Makezagonê
Di sazkirina Dadgeha Makezagonê ya di Makezagona 1982yan de

pirsgirêkên girîng hebûn. Ev avabûn, bi guhertina makezagonî ya 2010an di astekê de hatin verastkirin. Avabûna Dadgeha Makezagonê ku ji deh esil û ji çar endamê cihgir pêk dihat, êdî ji hivdeh endamê esîl pêk hatiye, statûya cihgiriyê jî hatiye bidawîkirin. Rakirina endamên cihgir baş bûye, lewra endamên cihgir çiqas jêhatî ba jî nedikaribûn tevlî heyeta endamên esîl yên Dadgeha Makezagonê bibin. Ji aliyê din ve endamên Dadgeha Makezagonê heta 65 saliya xwe dikaribûn di erka xwe de bimînin; lê belê ev sepandin jî hatiye rakirin, şûna vê dema peywîra wan bi 12 salan ve hatiye sînordarkirin.

Bi şiklê ewil ve endamên Dadgeha Makezagonê, 2 ji Dadgeha Bilind, 2 ji Şûreya Dewletê, yek ji Şûreya Eskerî, yek ji Dadgeha Îdareya Bilind a Eskerî, yek ji Dadgeha Dageriyê û yek jî ji aliyê Lijneya Giştî ya Hîndekariya Bilind (YÖK) yên ku wek endam hatin nîşandan ji nav sê qat endaman bûn û ji aliyê Serokomar ve dihatin hilbijartin. Sê endam jî rasterast ji aliyê Serokomar ve ji nav rayedarên bilind yên karmend û parêzaran dihatin hilbijartin. Li gorî gûhertina 2010an jî êdî Meclîs, du endaman ji nav sê kesan yên ku endam û serokên bi xwe yên Lijneya Giştî ya Dadgeriya Dageriyê hatine nîşan dan û endamek jî ji nav sê kesên serokên baroyan di nav parêzerên serbest nîşan dane ku hilbijêre. Serokomar jî çar endaman dê ji nav rayedarên kademeyên jor, parêzerên serbest, dadger û dozgerên pola yekem, raportorên Dadgeha Makezagonê yên ku herî kêm pênç sal wezîfe kirine rasterast hilbijêre; sê endaman ji Dadgeha Bilind,

du endaman ji Şûraya Dewletê, endamek ji Daraza Bilind a Eskerî, endamek ji Dadgeha îdareya Bilind a Eskerî ku hatiye nîşandan; sê endaman jî ji nav hîndekarîên ku di warê hiqûq, îktîsat, û zanîstên

siyasî de wezîfe dikin wek endam hatine nîşandan ku ne ji endamê lijneya hîndekarîya bilind in dê hilbijêre.
Di nûgeriyê de xalên herî girîng ên berbiçav ev in: Di avakirina dadgehê de giraniya daraza bilind hatiye bidawîkirin. Her wiha êdî Serokomar di dîyarkirina hemû namzetan de dê nabe xwedî biryar. Ligel vê yekê ji hivdeh endaman çardehê wan rasterast yan jî weke neyekser ji aliyê Serokomar ve dê bên hilbijartin, ev yek jî dide nîşan ku di pêkhatiya Dadgehê de bandora Serokomar bi awayekî girîng berdewam dike. Hejmara hîndekarên bilindî derket sisêyan, ev jî ji aliyê qelîteya venêrînê ya ku Dadgeha Makezagonê dike ve pêngaveke erênî ye. Ligel vê yekê ji ber ku TBMM rasterast tu endaman nikare hilbijêre, ev di pêkhatiya Dadgeha Makezagonê de wek kêmasîyek girîng tê dîtin. Lewra di sepandina Ewropayê de li tu welatan tune ku parlemento endaman hilnebijêre. Berovajî vê wekî li welatên Almanya, Polonya û Macarîstanê hemû endamên Dadgeha Makezagonê ji aliyê parlementoyê ve têne hilbijartin.
Hêzdarkirina Azadiya Îfadekirin û Azadiya Çapemeniyê-Weşanê
Qanûna bi dîroka Tirmêha 2012an ku di raya gîştî de weke “3. pakêta Darazê” tê zanîn ve verastkirinên ku mafên mirovan kûr dike û pêşve dibe yên girîng pêkanîn. Di paşerojê de di çarçoveya madeya 6emîn a TMKê (Qanûna Têkoşîna Li Dijî Terorê) ji bo dîrokên pêş cezayên sekinandina weşanê dikaribû were dayîn. Ev rewş jî dibû sedama gilî û rexneyan û wekî binpêkirina karîneya mesûmîyêtê dihat nirxandin û li ba Dadgeha Mafên Mirovan ya Ewropayê dibû mijara biryarên binpêkirinê.
Bi verastina ku di vê çarçoveyê de hatiye anîn di çarçoveya azadiya çapemenî-weşanê û azadiya îfadê de, cezayên sekinandina weşanên

pêş, hatine rakirin. Ligel vê yekê heta dîroka 31 Berfanbara 2011an, biryarên berhevkirinên derheqê weşanên çapkirî de bê hukmî hatiye hiştin û dîsa heta vê dîrokê ceza û dozên ku bi rêya çapemenî-weşanê hatine kirin jî paşde hatine xistin.

Ji Bo Darizandina Bi Dadî û Bilez Serastkirin

Di raya giştî de derbarê darizandinê de hin gilî û gazin hebûn, lewra li gor vê qenaetê darizandin pir dirêj dewam dikir. Ji bo çarêseriya vê pirsgirêkê tevdîr bên girtin jî daxwazên mafdar dihatin bilêvkirin. Ji bo dawî li giliyên darizandina dirêj bên kirin di çarçoveya 3. pakêta Darazê de, ûnsirên “sûca bandorlêkirina kesên peywirên darazê dikin” jinûve hatine serastkirin. Derfeta taloqkirina sûcên terorê yên sivik û wergerandina cezaya pere yên bi dadî hatiye anîn. Her wiha di mijara girtinê de, bo armanca kêmkirina pirsgirêkan, sînora qedexeya girtîbûnê derketiye dû salan. Çarçoveya sepandina kontrola adlî hatiye berfireh kirin. Bi saya vê sûcên ku cezayên wan herî zêde 2 sal in re, “rêzika darizandina bê girtî” hatiye anîn. Derfeta biryardayîna kontrola edlî hatiye berfirehkirin û bi vî awayî derbarê azadiya şexsî de pêşveçûn pêk hatiye.

Ji Bo Hêzdarkirina Azadî û Ewlehiya Kesayetiyê

Serastkirina Dadgerên Azadiyê

Di mewzûata ewil de; biryarên tevdîrê yên wek girtin, lêgerîn û guhdarîkirina li telefonê, ji aliye dadgerên dadgeha xwedî rayeya taybet ya ku li dozê jî dinêrî ve dihat dayîn.

Di çarçoveya 3. pakêta Darazê de ji bo bihêzkirina mafê parastine û mafê bersûcan, biryarên tevdîrê yên wek girtin, lêgerîn û lêguhdarîkirina telefonê sepandina “dadgeriya azadiyan” kete

merîyetê. Ji bo îtiraza li biryarên dadgerên azadiyan jî dîsa ji aliyê dadgerên ku bi vê armancê hatine wezîfedar kirin ve, dê biryar bên standin. Ji aliyê din mecbûriyeta xurtkirin û berbiçavkirina sedemên şênber yên girtîtiyê hat anîn û dema binçavkirinê hatiye kin kirin.
2002-2012
95
Sazkirina Dadgehên Malbatê
Ji bo çareserkirina kêşeyên nav malbatê yên ku dikevin qada darazê, di sala 2003yan de Dadgehên Malbatê hatin sazkirin. Di bin banê vê dadgehê de psîkolog, pedagog û pisporê xizmeta civakî hatin tayînkirin da ku ji bilî darizandinê, ji bo parastina malbatê tevdîrên parastin, perwerdekirin û civakî bigire. Bi dadgehên ku hatin sazkirin ve hat armanckirin ku, di dozên ku zarok û jin jî tê de ne, ji bo ku ev doz di nav rêzgirtin, hezkirin û xweşbîniyê de derbas bibin û ger hewce be ji pîsporan jî alîkarî bê xwestin û doz bi rêyên aştiyane bên safîkirin.
Firehkirina Sepandina Qada Serbestiya Bi Venêrînî
Serbestiya bi venêrîn sepandina ku derbarê kesên gumanbar û girtî de ji aliyê dadgehê ve, li şûna cezayên hepsê, dayîna cezayên alternatîf e. Bi vê sepandinê gumanbar û kesên girtî di hundirê civakê de tên kontrol kirin. Ev pergal ji bo teqîb û başbûna gumanbar û girtiyan pergalek ceza û înfazê ya alternatîf e. Di çarçoveya serbestiya bi kontrol de tevdîrên mînak yên xebitandina bê pere ya di karekî kêrî civakê tê de û dûrneketina xanî û herêma ku hatiye tesbît kirin têne sepandin. Ji bo berfirehkirina naveroka serbestiya bi kontrol, di sala 2012an de di naveroka qanuna têkîldar de guhertin hate kirin. Armanca vê qanûnê, li gor biryarên Şîret yên Konseya Ewropayê anîna sîstemeke înfazê û her wiha ji jiyana civakî re amadekirina girtiyan e.

Bi vê sepandinê ve hemû maweya girtîbûne êdî li girtîgehan wê neyê derbaskirin û kesên girtî di bin kontroleke eşkerekirî de ji bo jiyana hevpar dê bêne amade kirin.
Di vê çarçoveya ku hat tesbît kirin de girtî sala dawî ya maweya girtina xwe, dê bikaribin bi serbestiya bi venêrîn li derve derbas bikin. Ji bilî vê bi bikaranîna amûrên elektronîk ve di nav civakê de şopandin, çavdêrî û kontrolkirina girtî û gumanbaran jî gengaz e. Bi vî awayî girtî ji bo jiyana derve û berdewamiya pêwendî û têkilîyên malbatî têne amade kirin.
FIREHKIRINA MAFÊN ÇANDÎ
Û PÊNGAVÊN KU JI BO
DEMOKRATÎKKIRINA QADA
PERWERDEHIYÊ HATIN AVÊTIN
2002-2012
99
FIREHKIRINA MAFÊN ÇANDÎ Û PÊNGAVÊN KU JI
BO DEMOKRATÎKKIRINA QADA PERWERDEHIYÊ
HATIN AVÊTIN
Di dîroka me ya nêz de meriv dikare bêje ku ji refleksên herî girîng yên ku li ser tevgerên rêvebirên dewletê bibandor bû, tirsên ne hewce û tabû bûn. Bi taybetî ji ber “tirsa dabeşbûnê” û “ jênebaweriya ji civakê” daxwazên rewa yên bê guneh û demokratîk bi tirs û fikar û bi bertek hatine pêşwazîkirin. Xalên 141, 142 û 163 yên di Qanûna Ceza ya Tirk (TCK) de yên di sala 1991ê de hatin rakirin ku fikir û azadiya vegotinê asteng dikirin, dibûn sedema cezakirina gelek nivîskarên ku nêrîna wan çepgir an jî rastgir bûn. Ji aliyê din ve, vê xalê axaftina Kurdî, gotina stranan û weşana Kurdî qedexe dikir. Ev sepandinên ku hatin rakirin mezinahiya tirs û fikaran nîşan dide. Di heman çerçoveyê de ji bo ku di

zimanên cuda de weşan bê kirin, welatîyên me bikaribin zimanê xwe yê zikmakî hîn bibin, di zanîngehên me de derbarê zarava û zimanên cuda de beş vebin, û ji bo ku girtî û hukimxwarên li girtîgehan bi xizmên xwe re bikaribin bi zimanê xwe hevdîtin û axaftinê pêk bînin me sînga xwe daye ber bertekên mezin û piştre ev rûdan pêk hatin.
Bi heman awayî dersên agahiya ewlekariya netewî yên li dibistanên navîn, di heyama 28 sibatê de girtina qismên navîn yên liseyên pişeyî û di perwerdehiyê de sepandinên yekalî yên ku rê nedida derfetên cuda di heyama nêz de hin ji pirsgirêkên ku em rû bi rû diman û ji ber tirs û bê ewlehiyê derdiket holê cih digirtin.
Şoreşa Bêdeng
100
Di pêvajoya demokratîkbûna deh salan de, rakirina astengîyên li ber bikaranîna zarava û zimanên cuda û di serî de geşkirina van zimanan, firehkirina mafên çandî û di qada zêdetir demokratîkkirina pergala perwerdehiyê de û ji bo ku bigihije binesaziyeke piranîparêz pêngavên pir girîng hatine avêtin.
Di çerçoveya ku hat
destnîşankirin de
hînbûn û geşkirina
ziman û zaravayên
cuda hat pêşxistin
û derfeta weşanê
ya di van zimanan
de hate dayîn. Girtî
û hukimxwarên li
girtîgehan ji bo ku
bikaribin bi xizm û

malbatên xwe re bi zimanê xwe yê zikmakî hevdîtinê pêk bînin, hemî astengî û qedexe ji holê hatine rakirin. Tengasîyên li ber welatîyên ku bixwazin kîjan navî li zarokên xwe bidin bila bidin hatine rakirin. Di zanîngehan de derbarê ziman û zaravayên cuda derfeta lêkolînên akademîk, avakirina enstîtûyê û dersa bijarte hate mimkunkirin. Pêşiya kirina propagandaya siyasî ya di ziman û zaravayên cuda de hatiye vekirin. Qedexeyên li ber sînema, vîdeo û muzîkê hatine rakirin. Ji bo feeliyetên çandî yên di zimanên cuda de piştgirî hatiye dayîn. Ji bo ji xizmetên saziyên dewletê sûd bê wergirtin, wergervanê Kurdî hat îstixdam kirin û wekî avakirina navendên bangewaziyê sepandinên cuda têketin merîyetê. Ji aliyê dewletê ve mela hatine bicih kirin. Pergala perwerdehiyê hêj hat demokratîk kirin. Hejmara zanîngehan û kontenjanên ku ji perwerdehiya bilind re hatiye hiştin hate zêde kirin. Sepandina qatjimar ya cuda ku di ezmûna têketina zanîngehan de dihat sepandin, ji holê hate rakirin. Di zanîngehan de serbestiya cil û bergan hate anîn. Dersên Agahiya Ewlehiya Netewî jî hatin rakirin.

Di pêvajoya demokratîkbûna deh salan de, rakirina astengîyên li ber bikaranîna zarava û zimanên cuda û di serî de geşkirina van zimanan, firehkirina mafên çandî û di qada zêdetir demokratîkkirina pergala perwerdehiyê de û ji bo ku bigihije binesaziyeke piranîparêz pêngavên pir girîng hatine avêtin.

2002-2012

101

Ev pênpêngavên sereke yên ku di beşa envantera pirtûkê de bi awayekî kronolojik û hurgilî hatine rêzkirin li jêrê hatiye vegotin.

Derfeta Hînbûn, Xurtkirin, Pêşvebirin û Weşana Ziman
û Zaravayên Cuda

Ziman û zaravayên cuda yên ku nîşaneyeke dewlemendiya çanda welatê me ye; di seranserê salên dirêj de ji ber baweriyên bê mantiq, înkar û polîtîkayên redkirinê wekî çavkaniya xetere, tirs û fikar hatine dîtin.

Di vî warî de cara ewil di nav sala 2002yan de bi derxistina 3. pakêta AhengsaziyaYekîtîya Ewropayê ve, li ba Tirkî ku zimanê fermî ye, bi ziman û zaravayên cuda yên ku hemwelatî di jiyana xwe ya rojane de wek kevneşopîyek diaxivîn weşan hate mimkun kirin. Di nav heman salê de ji bo ku ziman û zaravayên cuda bên hînbûn ji kûrsên taybet re rê hatiye vekirin. Bi xebatên di vî warî de, di sala 2003yan de vekirina van qûrsan hat pêkxistin.

Derbarê vê mijarê de, di heyamên pêş de jî xebat hatin domandin. Di vê çerçoveyê de sala di sala 2003yan de, di televîzyonên taybet û TRT de ji bilî Tirkî ji bo karibe di ziman û zaravayên cuda de jî weşan bê kirin tengasîyên qanûnî hatin rakirin. Di vî warî de bi rêzîknameya ku hate amadekirin, bi ziman û zaravayên cuda ve derfeta weşana radyo û televîzyonan hate dayîn.

Herî dawî ev mijar di sala 2008an de hate hildan bin ewleyiya qanûnî û di radyo û televîzyonên taybet û di TRTê de derbarê vê yekê hemû asteng hatin rakirin. Di vê çarçoveyê de qanaleke TRT ê(TRT 6) tam roj dest bi weşana Kurdî kir. Di sala 2009an de jî ji bo ku radyo û televîzyonên taybet jî bikaribin bênavber weşanê bikin hemû astengên qanûnî hatine rakirin û pêşiya weşanê hatiye vekirin. Bi van guhertinan ve di ziman û zaravayên cuda de kirina weşanê

gihîşte ewlehîyeke qanûnî û li ser ekranên TRTê weşanên Kurdî û Erebî hatin destpêkirin.

Şoreşa Bêdeng

102

Ji Bo Hukimxwar û Girtîyan Li Girtîgehan Bi Malbat û Xizmên Xwe Re Pêkanîna Bi Zimanên Zikmakî Axaftin û Hevdîtin

Di heyamên borî de, ji ber hin hukmên ku astengî derdixistin yên li mewzûatê, girtî û hikûmxarên di girtîgehan de ji bilî zimanê Tirkî nepêkan bû bi zimanek din bi malbat û xizmên xwe re biaxivin û ragihandinê pêk bînin. Ev yek, ji bo welatîyên me yên Tirkî nizanin an jî derdê xwe bi zimanek din baştir dikarin vebêjin re tengasîyek mezin bû û rê li mexdûriyetên cidî vedikir. Ji ber vê qedexeyê, mafên axaftinê û azadiya wan dihat tengkirin.

Di sala 2009an de bi guhertina rêziknameya ku hate çêkirin, ger hukimxwar bide zanîn ew bi xwe yan jî ew kesê ku pê re hevdîtinê pêk bîne nizane Tirkî biaxive, bi telefonê di zimanên din de jî êdî dê bikaribe axaftinê bike. Paşê bi rêznameya ku hatiye derxistin ve girtî û hukimxwarên di girtîgehan de ji bo ku bikaribin bi ziman û zaravayên cuda û bi awayekî rû bi rû hevdîtinê pêk bînîn hemû tengasî hatine rakirin. Bi vî awayî qedexeyên li dûrî însantiyê hatin rakirin.

Ji Bo Hemwelatîyên Me Rakirina Hemû Qedexeyên Li Ber Navdanîna Zarokên Xwe

Berê welatîyên me nedikaribûn ji bilî navên Tirkî nav li zarokên xwe bidin. Ev qedexe li dijî demokrasî û dijî têgihîştina mafên mirovan bû. Ev qedexeya li dijî însanetiyê, ji aliyê hêlên cuda yên civakê ve dibû mijara rexneyên mafdar. Ji ber vê yekê bi paşerojê re eleqe

qut dibû û dewlemendiya çanda me zirar didît. Ji ber ku malbat nedikarîn navên ku bixwazin li zarokên xwe bikin di heman demê de binpêkirina mafên mirovan dihat jiyîn.
Di sala 2003yan de derbarê vê yekê de di Qanûna Nifûsê de xala têkildar hat guhertin û her wiha hemwelatîyên me kîjan navê bixwazin dikarin li zarokên xwe deynîn. Bi vê pênpêngavê re mexdûriyetên di vê mijarê de jî hatin bi dawî kirin.
2002-2012
103
Li Zanîngehan Derbarê Ziman û Zaravayên Cuda De
Pêkanîna Lêkolînên Zanîstî, Sazkirina Enstîtuyan û
Anîna Dersa Bijarte
Di nav welêt de axaftina ziman û zaravayên cuda, yek ji dewlemendiyên girîng ên Tirkiyeyê ne. Lê belê seranserê salên dirêj li ser ziman û zaravayên cuda zordestiyek hatiye kirin û hînbûn û hînkirina zimanên cuda hatiye astengkirin. Digel ku di jiyana rojane de qedexe li ser zimanên cuda ji holê hatibe rakirin jî li aliyê akademîk û zanînê ji bo lêkolîn bên kirin û ev zimanên cuda bên hînkirin xizmeteke perwerdehî-hîndekarîyê nehatiye kirin.
Ev zimanên ku li Tirkiyeyê tên axaftin ango ev zimanên “dijîn”, ji bo ku bi awayekî rast bê zanîn û hînkirin û li ser van lêkolînên akademîk bê kirin avakirina enstîtûyan û dayîna dersa bijarte hatiye mimkûn kirin.
Di vê çarçoveyê de, wek pêngava ewil, di sala 2009an de di bin banê Zanîngeha Artûklû ya Mêrdînê de; ku ji Şaxa Makezanîstî ya Çandî û Zimanê Kurdî, Şaxa Makezanîstî ya Çandî û Zimanê Erebî, Şaxa Makezanîstî ya Çandî û Zimanê Sûryanî, Programa Lîsansa Bilind ya Çand û Zimanê Kurdî û Programa Lîsansa Bilind ya Çand û Zimanê Sûryanî pêk tê “Enstîtûya Zimanên Dijîn ya Li Tirkiyeyê ”

hate vekirin. Di nav peymangeha heman zanîngehê de Beşa Wêje û Zimanê Kurdî jî hatiye vekirin.
Di pêvajoya ku pêşve diçe de, di bin banê Zanîngeha Bingolê de; ku ji Beşa Bingehîn a Wêje û Zimanê Kurdî û Programa Lîsansa Bilind a Bi Tez /Bê Tez ya Wêje û Zimanê Kurdî pêk tê "Enstîtûya Zimanên Dijîn" hate damezirandin, girêdayê zankoya Fen û Wêje ya Zanîngehê jî Şaxa Makezanîstî ya Wêje û Zimanê Kurdî hatiye vekirin. Li Zanîngeha Alparslana Mûşê jî di nav Enstîtûya Zanîstên Civakî de Şaxa Makezanîstî ya Wêje û Zimanê Kurdî, di nav Zankoya Fen û Wêje de jî Beşa Wêje û Zimanê Kurdî hatiye vekirin.
Di bin banê Fakulteya Wêje ya Zanîngeha Tunceliyê de Beşa Wêje û Zimanên Rojhilatê, Şaxa Makezanîstî a Wêje û Zimanê Şoreşa Bêdeng
104
Dimilkî(zazakî), Şaxa Makezanîstî ya Wêje û Zimanê Kurmancî û Şaxa Makezanîstî ya Wêje û Zimanê Erebî hatiye vekirin. Li Zanîngeha Dîcle ya Dîyarbakırê jî di bin banê Enstîtûya Zanîstên Civakî de Şaxa Makezanîstî Çand û Zimanê Kurdî hatiye damezirandin.
Rêvekirina Pêşiya Di Ziman û Zaravayên Cuda De Propagandayê
Di hilbijartinê de, ji bilî zimanê Tirkî di ziman û zaravayên cuda de propagandaya siyasî qedexe bû. Derbarê kesên ku vê qedexeyê binpêdikirin de, lêpirsîna îdarî didan destpêkirin yan jî cezayên din dihatin birîn. Ev rewş him li ber bi awayekî azad bikaranîna mafên siyasî him jî ji bo ku di zimanên ku hilbijêr baştir fêm dikin de xebatên siyasî yên serkeftî bên kirin astengî bû.
Bi guhertina ku di sala 2010an de hate kirin, çerçoveya hiqûqa partiyên siyasî hatiye berfirehkirin, astengîyên qanûnî ku li ber mafê îfade û

birêxistinbûnê yên propagandaya siyasî bûn hatin rakirin. Bi saya vê partiyên siyasî xebatên xwe yên di hilbijartinê de, bi ziman û zaravayên cuda yên hemwelatîyên me diaxivin dikarin bang li wan bikin.

Rakirina Qedexeyên Li Ser Berhemên Sînema, Vîdeo û Muzîkê

Li welatê me yek ji tengasîyên herî girîng yên li ber pêşveçûna çand û hunerê jî li dijî berhemên hunerî qedexeyên kêfî û hêsan bûn. Ji ber hinceta ewlekariya dewletê û bi sedemên kêfî û îdeolojîk berhemên fikir û hunerê bi hêsanî dihatin qedexe kirin yan jî rastî sansurê dihatin. Ev jî itibara Tirkiyeyê ya di asta civaka navneteweyî de dihejand.

Bi guhertinên ku hatin kirin ve çarçoveya qedexekirina vê mijarê hatiye teng kirin û biryara qedexekirinê ya ku ji aliyê rayedarên îdarî ve tê dayîn, bi şerta divê ev biryar di nav 24 seetan de bînin pêşberî dadger hatiye girêdan. Ji bilî vê pêngavê, ji Lijneya Venêrîna Berhemên Sînema, Vîdeo û Muzîkê jî nûnerê Lijneya Ewlekariya Neteweyî (MGK) hatiye derxistin.

2002-2012

105

Piştgirîdayîna Feeliyetên Çandî Yên Bi Zimanên Cuda

Berê piştgirîdayîna xebatên çandî yên di ziman û zaravayên cuda de mijareke wisa bû ku ji xwe ne gengaz bû ku bihata fikirîn. Ewqas ku piştî derbeya eskerî ya 12ê Îlonê di heyamekê de, ziman û zaravayên cuda yên ku welatîyên me di jiyana xwe ya rojane de diaxivîn jî hatibûn qedexekirin. Li hemberî vê yekê di deh salên dawîn yên welatê me de, wekî her warî di vî warî de jî guhertinek pir girîng hatiye kirin û nêrînek azad hatiye parastin.

Di vê çarçoveyê de; ji aliyê Wezareta Çandê ve dest bi weşana hin berhemên wekê “Mem û Zîn” yên ku ji bo Wêje û Zimanê Kurdî pir

girîng in hatiye kirin. Ji aliyê Midûriyeta Giştî ya Şanoyên Dewletê ve jî li hin bajaran lîstikên şanoya Kurdî hatine lîstin. Ji aliyê Lijneya Piştgirîdayîna Sînemayê ya Wezareta Çand û Tûrîzmê ve cara yekem, ji fîlmekî re ku di nav de zêdetir diyalog û axaftinên Kurdî derbas dibû (İki Dil Bir Bavul- Du Ziman û Baholek) piştgirîya madî hate kirin.

Televîzyona Dewletê TRT malpereke xeberên Kurdî ya bi navê "TRT XEBER" dest xiste weşanê. Bi xebata hevpar ya TRT û Walîtiya Dîyarbekirê albûmeke ku ji stranên Kurdî pêk tê hate amade kirin.

Ji bilî van, di kataloga ku ji bo endamên heyama 24emîn ya Meclîsê bide nasandin hate amadekirin û cara yekem di nav agahiya "zimanên ku parlamenter dizane" de "Kurdî" jî cîh girt ku ev geşedanek nû ye.

Ji Bo Sûdewergirtina Ji Xizmetên Gelemperîyê

Îstihdamkirina Wergervan û Sazkirina Navendên

Bangewaziyê

Welatiyên me yên ku Tirkî nizanin, dema li sazî û dezgehên dewletê kar û kirariyên xwe dikirin an jî dixwestin teqîp bikin, tengasî û zehmetiyên mezin dijiyan.

Bi armanca ku ev pirsgirek were çareserkirin li cihên hewcetî pê hene, ji bo ku welatîyên me yên Tirkî nizanin ji xizmetên gelemperîyê

Şoreşa Bêdeng

106

bê kêmasî sûde werbigirin zihnîyeta berê hatiye şikandin. Di vê çerçoveyê de hêsankirinên wek li şûbeyên rêvebirinan îstixdama wergêrê Kurdî hatine kirin. Ji aliyê din ve, hin walîtiyan jî ji bo ku qelîteya xizmetên sazî û dezgehên gelemperîyê bên zêdekirin, di navendên bangewaziyê yên ku hatin avakirin de ji bo ku bi welatîyên Tirkî nizanin re ragihandin bi hêsanî pêk were personelê ku Kurdî

diaxive hatiye wezîfedarkirin.

Ji Aliyê Dewletê Ve Îstixdamkirina Meleyan

Seranserê salên dirêj dewletê qîmeta hewce neda şexsîyetên olî yên ku li Herêmên Rojhilat û Başûrê Rojhilatê Anatoliyayê tên hezkirin û ji wan re rêz tê girtin. Ev yek li ber jihevhezkirin û lihevgermbûna gel û dewletê astengîyeke pir mezin bû.

Ji sala 2012an pê ve, li herêmên Rojhilat û Başûrê Rojhilatê, melayên ku di warê olî de perwerde dîtine, ji aliyê dewletê ve wek "wezîfedarê Olê" hatine îstixdamkirin. Ev sepandina ku ji bo meleyên li ba gelê herêmê xwedî rêz û hurmet in re hate kirin, ji aliyê xurtkirina pêwendiyên di navbera dewlet û welatîyan de bi kêfxweşî hatiye pêşwazîkirin.

Demokratîkkirina Pergala Perwerdehiyê

Geşbûn û belavbûyîna perwerdehiyê, ji bo ku demokrasî ji aliye girseyên mezin bê pejirandin ji şertên herî girîng yek e. Di pêvajoya demokratîkbûnê ya di deh salên dawî de di vî warî de pêngavên pir girîng hatine avêtin. Belavbûyîna perwerdehiyê û hemû welatî tevlîkirina pêvajoya perwerdehiyê, li gorî heyama berê hema bêje du qat zêdekirina hejmara polan, bê pere ji xwendekaran re belavkirina pirtûkên dersê, bi pergalên biaqil û teknolojîyê ve arastekirina polên dersê û geşedanên wekî di perwerdehiyê de jiholêrakirina cudatiyên herêmî, ji bo pêşveçûn û demokratîkbûna welêt nirxek pir mezin e. Ji sala 2003yan heta Çileya 2013yan, 36.109ê wê ji aliyê welatîyên me yên xêrxwaz bi tevahî 188.459 polên dersê hatine qedandin

2002-2012

107

û ketine xizmeta perwerde û hîndekariyê. Di navbera (Çile 2013) 2003-2013an de 1.058 heb salonên werzîşê hatine çêkirin

û bo xizmetê
hatine vekirin. Di
dibistana ewil û
navîn de Biyolojî,
agahiya Fenê, Fizîk,
Kîmya, sepandina
karbendî, hêjmara
l a b o r a t û v a r ê n
zimanê biyanî û
laboratûvarên ku
hevpar tê bikaranîn
di sala heyama 2002-2003yan ya perwerdehiyê de ji 18.853yan, di heyama 2012-2013an ya perwerdehiyê de gihîştiye 34.723yan. Hejmara pîrtûkxaneyên li dibistanên ewil û navîn (ji bilî pîrtûkxaneyên polê) di heyama perwerde-hîndekarî ya sala 2002-2003yan de 11.945 bû lê di heyama perwerde-hîndekarî a sala 2012-2013an de gihîştiye 21.318 an. Ji sala 2002-2003yan heta sala 2012an 880 lib avahiya wargeha dibistana ewil û navîn hatiye vekirin, qapasiteya nivînin nû hatiye peydakirin. Li dibistanên hemû deverên Tirkiyeyê girêdana înterneta bilez hatiye gihandin. Ji sala 2003yan pêve pirtûkên hemû dersan yên dibistana ewil û navîn bê pere hatiye belavkirin. Di çarçoveya “Projeya Fatîhê” de heta dawiya sala 2015an ji hemû polan re texteya biaqil, ji bo mamoste û xwendekarên dibistanên navîn û amedehiyê belavkirina compîtira tablet, li dibistanan temînkirina gihandina interneta banda fireh, amedehiya naverokên elektronîk, ji bo ku mamoste teknolojîyê bi awayekî bandordar bikar bînin, xebatên perwerdehiyê hatine plankirin û li gorî rojimêrê kar û kirarî têne

birêvebirin.
Yek ji geşedanên girîng ên di warê perwerdehiyê de, bêguman bi serastkirina mewzûatê ya di sala 2012an de hatiye pêkxistin. Bi
Hejmara pîrtûkxaneyên li
dibistanên ewil û navîn (ji bilî
pîrtûkxaneyên polê) di heyama
perwerde-hîndekarî ya sala
2002-2003yan de 11.945 bû lê
di heyama perwerde-hîndekarî
a sala 2012-2013an de gihîştiye
21.318 an.
Şoreşa Bêdeng
108
qanûna ku di raya giştî de wek qanûna 4+4+4 tê zanîn û di 30ê Adara 2012an de li parlementoyê hat pejirandin ve; şûna perwerdehiya 8 salî ya bênavber ku
vêga jî tê sepandin,
perwerdehiya bi
merhele ya zorî ya
12 salî hatiye anîn û
ev dema bi 12 salî bi
sê merheleyan hatiye
cuda kirin. Zarok
êdî 60 mehî dest bi
dibistanê dikin (di
rewşên mecbûrî de
temenê destpêkirina
dibistana ewil herî

zêde dê bibe 66 meh).
Perwerdehiya ewil wek 4 sal dibistana ewil û 4 sal dibistana navîn hatiye serastkirin. Lîse jî êdî bûn mecbûrî. Pûanên pêvek ên dibistanê ku di têketina zaningehê de dihat sepandin û cudatiyên qatjimarên ku di têketina ezmûna zanîngehê de tê sepandin hatin rakirin. Ji destpêka dibistana navîn pê ve Qûr'ana Pîroz, Jiyana Hz. Pêxember û hin ders wekî bijarte hatine anîn. Di dibistanên navîn û Îmam-Xetîbê de dersên ku di lîseyê de kêr ben li gor jêhatîbûn, geşedan û tercîhên xwendekaran wek bijarte hatin avakirin.
Pergala perwerdehiya pêwîstî ya bi merhele ya 12 salî, di perwerdehiya netewî de ji bo di nav welatîyan de wekheviya fersendê pêk bîne bûye pêngaveke girîng. Taybetiya vê serastkirinê ya herî girîng ew e ku derfeta gelek tercîhê aniye li ber hemwelatîyan. Her wiha perwerdehiya bi yek hêlan ya ku bi pêvajoya 28ê Sibatê hatibû anîn hema hema hatiye jiholêrakirin.
Bi pêkanîna dersên bijarte yên di merheleyên cuda de tê armanc kirin ji perwerdehiyê bendewariya xwendekarên ji her beşê û daxwazên civakî û çandî yên van xwendekaran were cî. Di vê çarçoveyê de li
Pergala perwerdehiya pêwîstî ya bi merhele ya 12 salî, di perwerdehiya netewî de ji bo di nav welatîyan de wekheviya fersendê pêk bîne bûye pêngaveke girîng. Taybetiya vê serastkirinê ya herî girîng ew e ku derfeta gelek tercîhê aniye li ber hemwelatîyan. Her wiha perwerdehiya bi yek hêlan ya ku

bi pêvajoya 28ê Sibatê hatibû anîn
hema hema hatiye jiholêrakirin.
2002-2012
109
ser daxwazê pêşiya hînbûna dersa bijarte ya ziman û zaravayên cuda hatiye vekirin. Bi vî awayî cara yekem di mufredata perwerdehiya netewî de di serî de Kurdî sepandina dersa bijarte ya ziman û zaravayên cuda hat destpêkirin, ev yek jî nîşan dide ku di vî warî de guhertina paradîgmayê ya mezin hatiye kirin.
Zêdekirina Hejmara Zanîngehan û Kontenjanên
Hîndekariya Bilind
Li Tirkiyeyê, di sala 2002yan de bitenê zanîngehên 40 bajaran hebûn, bi tevahî hêjmara
zanîngehan jî 76
bû. Ji van bi tenê 23
ji wan zanîngehên
weqfê bûn. Ji bilî vê
ji xeynî derbasiya
bêezmûnî, hejmara
namzetên ku serî li
Ezmûna Hilbijartina
Xwendekar (ÖSS)
didan 1.540.422 bûn,
ji bo programên
lîsans û pêş lîsans
(Programên jêhatînî yên taybet jî tê de) kontenjan hemû li ser hev 396.646 bûn. Yanî ji çar kesên ku serî li ezmûnê didan encax yek ji wan dibû xwendekarê zanîngehê. Ev rewş mafê perwerdehiyê

sinordar dikir û li ber têketina zaningehê ya xwendekaran astengîyek girîng bû. Ji ber neketina zanîngehê, li ser derûniya xwendekar û malbatên wan ji aliyê sosyo psikolojîk ve zordestiyek girîng derdiket holê. Ji aliyê din ji ber ku gelek xwendekaran perwerdehiya li derveyî welêt hildibijart, di aboriyâ welêt de jî windahiyên mezin û girîng çêdibûn.

Di deh salên dawî de, li temamiya heştê û yek bajarên Tirkiyeyê zanîngehên dewletê hatine damezrandin û 66ê wan weqif, bi

Yanî ji çar kesên ku serî li ezmûnê
didan encax yek ji wan dibû
xwendekarê zanîngehê. Ev rewş
mafê perwerdehiyê sinordar dikir
û li ber têketina zaningehê ya
xwendekaran astengîyek girîng
bû. Ji ber neketina zanîngehê,
li ser derûniya xwendekar û
malbatên wan ji aliyê sosyo
psikolojîk ve zordestiyek girîng
derdiket holê.

tevahî hêjmara zanîngehan derket 170an. Zêdebûna zanîngehan kontenjana xwendekaran jî bilind kiriye; kontenjanên ku ji lîsans û pêşlîsansê re hatine
hiştin (programên
jêhatînî yên taybet jî
tê de), li gorî 2002yan
nêzî 2 qat û nîv bilind

bûye, di sala 2012an
de gihîştiye 937.676
an. Di sala 2012an de ger serîlêdana 1.860.515 namzetan a li Pergala Bicihkirin û Hilbijartina Xwendekaran (ÖSYS) li ber çav bê girtin, ji sala 2012an pêde ji her 2 namzetên ku serî li ezmûnê dabin yek ji wan êdî gihîştiye derfeta têketina zaningehê.
Bi guherîn û veguherîna Tirkiyeyê xwendekar zêdetir gihîştine zanîngehan û dema ku xwendekar derbasî perwedehiya bilind dibin jî gelek derfet û alternatîf pêşkeşî wan hatiye kirin. Zanîngehên ku roj bi roj hêjmara wan zêdetir dibin, li kîjan bajarî ava bibin, têkariyek girîng didin warên aborî û civakî a wî bajarê. Bi saya vê asta ku Tirkiye di perwerdehiya Bilind de bidest xist, ji binesaziya ku bi tenê xizmetê dide ji sê paran parekê nifûsa di heyama zaningehê de xwe xilas kir (hîndekarîya bilind a elît). Her wiha gihîşt binesaziya ku dikare ji nîvê nişteciheê xwe re hîndekarîyek bilind a gerdûnî amade bike.
Di heyamên deh salên dawî de, ji aliyê TÜBİTAK-ARDEB (Serokatiya Bernameyên Piştgirîya Lêkolînê) ve piştgirîya ku dihatdayîn zanîngehan hat zêdetir kirin. Di vê heyamê dê budçeya TUBÎTAKARDEB ê bi tevahî, bi zêdebûnek 16 qatî ve ji 19, 5 mîlyon TL
derketiye 311, 9 mîlyon TL yê. Hejmara projeyên zanîngehê ku ji aliyê TÜBİTAK-ARDEB ê ve destekkirin 548 bû, di sala 2012an de ev hêjmar derket 1.131an. Ji bo projeyan xerceyana tevahî ji 13 mîlyon TL yê hat derxistin 168 mîlyon TL yê. Serê projeyê kêmzêde xerceneya salane ji 10.515 TL yê derket 61.439 TL yê. Ji xeynî van, hêjmara mirovên zanyar yên ji aliye TÜBİTAKê piştgirî ditîtin di sala 2002yan de 1.696 bû, lê di sala 2012an de ev hejmar hat derxistin 18.424 ê.
ji sala 2012an pêde ji her 2
namzetên ku serî li ezmûnê dabin

yek ji wan êdî gihîştiye derfeta
têketina zaningehê.
2002-2012
111
Ji Holê Rakirina Sepandina Pûandayîna Cuda Yên Ku
Di Ezmûna Ji Bo Têketina Zanîngehan Dihat Sepandin
Di pêvajoya 28ê Sibatê de wekî warên din di warê perwerdehiyê de jî gelek azadî hatine astengkirin. Di vê çarçoveyê de di sala 1998î de biryarek ku ji aliyê
Lijneya hîndekarîya
Bilind (YÖK) ve
hate girtin, di
pergala têketina
ezmûna zanîngehê
de guhertinek hatiye
kirin; ji bo tercihcihên
“nav qad” û “derveyi
qad” hejmarên qatê
hatine cudakirin û bi vê pênpêngavê ji bo xwendekarên ji lîseyên pişeyê mezûn dibin têketina zaningehê pir dijwar bibû.5
Ev sepandina
ku di nav xwendekaran de bû sedema ne wekheviyê ye û cudatiyê, di heyama 28ê Sîbatê de li ser niqaşên laîktiyê ji bo xilaskirina rejîmê wek pêngavek stratejîk hatiye dîtin. Ev serastkirin, digel hemû rexne û bertekan, ji bo ku eleqeya li ser imam xatîban bişkînin û kêm bikin wek tevdîr bi awayekî bandordar hatiye sepandin. Bi rasti ligel bi ‘sepandina hêjmara qat a cuda’, bitenê ne ji bo lîseyên imam xatîp an jî ne lîseyên pişeyê, ji bo xwendekarên hemû liseyan azadiya hînbûnê

hatiye sînordarkirin. Bi bandora vê sepandinê li ba xwendekarên ku dixwazin perwedehiya xwe a bilind bikin qîmeta liseya pişeyê nemaye; piştî ve yekê jî di ware pîşesaziyê de bi awayekî cidî pêdiviya kesên ku bikaribin bixebitin çêbûye. Sepandina hejmara qat a cuda di wîjdana rayagiştî û jiyana mirovan de birînin xedar vekiriye. Lê Lijneya
5 Bi vê verastkirinê di perwerdehiya navîn de xwendekarên ku li der qad a xwe tercih
bikirana, pûanên wan yên bicîhbûna hindekariya bilind dişkestin. Wek mînak
xwendekarek ku di beşa Zanistên Fenê de duxwend dema di qada xwe de tercih bikira,
Pûana Serfirazî a Hindekariyanavend (AOBP=PSHN) ya wî bi 0, 5 ê re dihat lihev
xistin. Lê dema heman xwendekar li der qada xwe tercih bikira wek mînak Hiqûq tercih
bikira AOBPê wî bi 0, 2 yê re dihat lihev xistin. Lê di sepandina berê de nedigotin
xwendekar ji kîjan beşe mezun bûye û hemû jî wek hev dihatin hesap kirin.
Bi bandora vê sepandinê li
ba xwendekarên ku dixwazin
perwedehiya xwe a bilind bikin
qîmeta liseya pişeyê nemaye; piştî
ve yekê jî di ware pîşesaziyê de
bi awayekî cidî pêdiviya kesên ku
bikaribin bixebitin çêbûye.
Şoreşa Bêdeng
112

Hîndekarîya Bilind di 1ê Berfanbara 2011an de hejmara qat a cuda ji nûve serast kir û ev sepandin ji hole hat rakirin.

Li Zanîngehan Serbestiya Cil û Bergan

“Qedexeya Şerpeyê ya li zanîngehan” digel ku tu sparteka wê a qanûnî tunebe jî dibe ku wek nîşaneya şert û mercên derasayi yên Tirkiyeyê bê dîtin. Ex qedexeya ku tê wateya binpêkirina “azadiya ol û wijdan”ê û li ser bedena însanê binpêkirina mafê tesarûfê, di raporên navneteweyî yên derbarê azadiya baweriyê de gelek caran dibû mijarên rexneyê.

Ligel pêvajoya asayîbûn a li Tirkiyeyê di çarçoveya rêbaza gerdûnî a “ azadî hîm in, sînordarkirin îstîsna ne” de bi guhertina zîhniyetê a li zanîngehan ev sepandina qedexeparêz jî bikirarî ji holê hatiye rakirin. Digel di qanûnên me de tu xal an jî hukmên wek tu kes perwerdehiya xwe bi şerpeyê nikare bikin tunebe jî, wek hinceta vê qedexeyê biryarên Rêznameya Rêzkariya Lîjneya Hîndekariya Bilind û Dadgeha Destûra Bingehîn dihat nîşandan. Lê ger sparteka wê a qanûnî tunebe maf û azadiyên bingeh bi rêznameyan nikarin bên sînordarkirin an jî ji holê rakirin. Ji bilî vê di hiqûqê de li gor rêbaz a ‘hiyerarşiya normê’ derxistina rêznameyek ku bê desteka qanûnê qedexe bîne ne mimkûn e.

Peywira hiqûqî ya Dadgeha Makezagonê, derbarê lihevnehatinek zagonî û derbarê bûyeran de ye. Dadgeha Makezagonê nikare wek zagonsazi û rêvebirî tevbigere û di warê xizmetên gişтiyê de biryarek bide an jî nikare rêznameya saziyên dewletê sererast bike. Di vê wateyê de ger erka Dadgeha Makezagonê li ber çav bê girtin qedexeya şerpeyê a li zanîngehan bi kêfî hatiye sepandin û ji aliyê qanûnê ve tu bingeha wê tune û meşrû jî nebûye.

Rakirina Dersa Agahiya Ewlehiya Neteweyî

Di warê perwedehiya neteweyî de hem ji aliyê vegotin hem jî ji aliyê mûfredatê ve guhertinên gelek girîng hatin kirin. Di vê çerçoveyê de,
2002-2012
113
dersa “Agahiya Ewlehiya Neteweyî” ku ev sî û sê salên di mûfredata dibistana navîn de bû û ji aliyê peywirdarên eskerî ve dihata dayîn, di nav sala 2012an de hatiye rakirin û naveroka vê dersê, di nav dersên din dê jinûve hatiye serastkirin. Ev geşedan, di rêya sivîlbûna pergala perwerdehiyê û mûfredatê de pêngavek girînge.
PÊNGAVÊN DI WARÊN CIVAKÎ-ABORÎ
DE HATIN AVÊTIN
2002-2012
117
PÊNGAVÊN DI WARÊN CIVAKÎ-ABORÎ DE HATIN AVÊTIN
Seranserê Dîroka Komarê yek ji pirsgirekên herî girîng a Tirkiyeyê ewe ku ji aliyê aborî û pêşketina civakî ve di nav herêm û bajaran de pêşketinek bi denge ne hatiye kirin. Ji salên 1960an pêde planên pêşketinê dest pê kirine, hatiye armanckirin ku di navbera bajar û herêman de cudatiya pêşveçûna aborî û civakê bê kêmkirin; lê belê di vê warê de geşedanek cidî nehatiye bidestxistin. Heta salên 2000an, ji bo ku hemû herêm û bajar bi denge pêşve herin binêsazî û pêdîviyên bingeh yên welatîyên ku li qada çolterê dijîn wekî rê û ava vexwarinê nehatiyê çêkirin û
rayedar wezîfeyên
xwe yên di vê warê
de ne anîne cih. Li
ba van tengasîyên
wekî binesaziya

ragihandinê, ji
ber qisawetên
ewlehiyê yên li
herêmên Rojhilat
û Başûrê Rojhilatê
Anatoliya yê, di
warên pêşveçûna
aborîyê de tesîsên
pîşesazî û hilberînê bi tenê li hin herêmên welêt bi cih bûn. Di serî
de herêmên Rojhilat û Başûrê Rojhilatê Anatoliya yê heremên ku
ji aliyê aboriyê ve li paş de mane, digel razemeniyên dewletê yên
Ji xizmetên wekî rê, ava
vexwarinê û binesaziyê bêpar
mayina hemwelatîyên ku li
qada çolterê dijîn, nehêsanî
gihandina xizmetên bingeh yên
wekî perwerdehî û tendûrîstiyê,
koçberiya ji çolterê ber bi bajarên
heremê ku ji ber pirsgireka terorê
a li herêmên Rojhilat û Başûrê
Rojhilatê Anatoliyayê diqewimî,
pirsgirêkên civakî yên ku divê
bilez bên çareserkirin derxist holê.
Şoreşa Bêdeng
118
hindik û mekanîzmayên teşwîkê, binesaziyek hilberîn û sanayiyê ya
xurt çênebûye. Li welêt ji ber ku li hin herêman ji aliyê aboriyê ve
hindik pêşketin çêbû, pirsgirêka pêşketina hindik a civakî jî derket

holê. Ji xizmetên wekî rê, ava vexwarinê û binesaziyê bêpar mayina hemwelatîyên ku li qada çolterê dijîn, nehêsanî gihandina xizmetên bingeh yên wekî perwerdehî û tendûrîstiyê, koçberiya ji çolterê ber bi bajarên heremê ku ji ber pirsgireka terorê a li herêmên Rojhilat û Başûrê Rojhilatê Anatoliyayê diqewimî, pirsgirêkên civakî yên ku divê bilez bên çareserkirin derxist holê.

Di vê çerçoveyê de bi girêdayi pêvajoya demokratîkbûnê a di heyama deh salên dawî de di serî de herêmen Rojhilat û Başûrê Rojhilatê, ji razemeniyên aboriyê re lez hatiye dayîn û ji bo cudatiya pêşketina herêmî bê kêm kirin ji aboriyê heta jiyana civakî, ji perwerdehiyê heta tendûrîstiyê, ji binesaziyê heta vejenê di gelek waran de razemeniyên têrker pêkhatine. Di pêvajoya deh salî de, razemeniya gelemperî yên ku bo herêmên Rojhilat û Başûrê Rojhilatê hatine kirin bi giştî ji 37 mîlyar TLyê derbas bûye.

Di çarçoveya ku hate destnîşankirin de pêşketina aborî hatiye pêkxistin. Di warê tendûrîstî û ewlehiya civakî de reformên binîgirtî pêkhatine. Hejmara balafirgeh, trafiqa rêhewa û hejmara rêwî hatiye zêde kirin. Rêyên dabînkirin hatine zêdekirin û çûnhatina rêbejê hêsan bûye. Projeyên xaniyên komî hatine belavkirin. Ji bo herêmên hindik pêşveçûyin, ji aliyê civak-aboriyê bên pêşxistin, bi armanca ku ji welatîyên me yên li qada çolterê dijîn re xizmeta rê û ava vexwarinê were kirin, Projeya Piştevaniya Binesaziya Gundan(KÖYDES) û Piştgirîdayîna Binêsaziya Şaredariyan(BELDES) hatiye sepandin. Ji bo ku herêmên Rojhilat û Başûrê Rojhilatê Anatoliyê ji aliyê civakî ve pêşve here dest bi sepandina Bernameya Piştevaniya Civakî hatiye kirin. Ji ber ku potansiyela devertî bixin tevgerê û hevkariyê pêşbixin di navbera raya giştî, kesên taybet û saziyên civaka sivîl de Ajansên Pêşveçûnê hat xistin faaliyetê. Ji bo arîkarî bigihije her malan

bernameyên destek ên civakî û arîkariya civakî bi awayek taybet hatine pêşxistin û çavkaniyên alikariya civakî yên ji bo welatîyên 2002-2012
119
me yên xizan, bêkes û mûxtaç bi rêjeyek girîng hatiye zêdekirin. Ji bo jiyana kesên astengdar, xizmên şehîd û xaziyan bê hêsankirin, sepandinên polîtîkayên civakî hatiye kirin. Ji bo komên bêavantaj jî cudatiya pozîtif a ku tê sepandin hatiye zêdekirin. Bi Plana Tevgerê a Projeya Başûrê Rohilatê Anadolê (GAP) ve halxweşiya herêmê hatiye zêdekirin. Ji malbatên ku ji ber hin pirsgirekan ji gundê xwe veqetiyabûn lê êdî dixwazin vegerin, bi armanca ku werin bicihkirin Projeya Rehabilitasyonê û Vêgera Gund destpêkirin. Tanzimkirina zirarê yên mexdûrên terorê jî dest pê kiriye.
Ji pêngavên sereke yên ku di beşa envantere ya pirtûkê de bi awayekî kronolojîk û hurgilî hatine rêzkirin li jêrê hatine vegotin:
Nîşaneyên Aboriya Makro û Pêşketina Aborî
Reformên ku Tirkiye di deh salên dawî de di warê demokratîkbûn û mafên mirovan de pêkanî, ligel bi pêşketina civakî û nîşaneyên makro-aboriyê ve pêkhatiye. Digel aloziyên li dinyayê û geşedanên neyînî yên li herêma me, nîşaneyên pêşketina civakî û aborî yên ku welatê me bidestxist, çêkirina reformên di warê mafên mirovan û demokratîkbûnê de yên li Tirkiyeyê jî hêsantir kiriye. Lewra heke li derdorekê nîşaneyên aboriyê ne êrenî be, dê pêkhatina reformên guhertin û veguherînên bingeh pir dijwar bibûya. Di vê çerçoveyê de li jêrê li ser hinek geşedanên makro-aborî yên ku vê guherîn û veguherînê hêsankiriye tê sekinandin.
Di heyama beriya 2002yan de, Tirkiye; welatek wisa bû ku hema bêje razemeniyên nav welêt û der welêt bi temamî sekinibû, sermaye

derketibû derveyî welat, bê karî herî zêde bibû, di dîroka nêz de tengasîya aboriyê ya herî mezin dijiya û her roj bi dehan şîrket dihatin girtin.
Di heyama piştî 2002yan de jî aboriya Tirkiyeyê veguherînek mezin derbas kir û di gelek waran de reformên binesazî pêk hatin. Di vê çerçoveyê de dîsîplînek hat darayiya giştî, di serî

de piyaseyên darayi di sektorên çandinî, civakî, ewlekarî, vejen û ragihandinê de reformên girîng pêk hatin. Bi saya reforman binesaziya saziyên aboriyê hatine xurt kirin û ji bo saziyên xweser bên avakirin, li hemberî pêlên ku dê di piyaseyên navnetewî de biqewimin aborî hatiye xurt kirin. Piyaseyên sermayeyan li gorî têgihîştina heyama nûjen, jinûve hatiye serastkirin û gelek astengîyên burokratîk ji holê hatin rakirin. Di sala 2005an de ji pereyê şeş sifir hatine rakirin, her wiha di kirariyên benqeyan de û di xerçkirina rojane ya welatîyande hêsaniya hesapkirinê hatiye çêkirin; di qada navneteweyî de nirxa pereya Tirkiyeyê hatiye bi rûmet û bi îtîbarkirin. Bi saya reformên ku di warê aboriyê de bi awayekî biryardar hatin kirin û aboriyê hêzdartir û hêj bi îstiqrar kir, ji aliyê nîşaneyên makro-aborî ve encamên gelek êrenî hatine bidestxistin. Di sala 2001î de, bi bandora qriza aboriya ku qewimî bi rêjeya ji sedî 5, 7 ve aboriya welêt teng bû. Aborî, ji sala 2002yan pê de xwedahev û dest bi mezinbûnê kiriye. Aboriya Tirkiyeyê di heyama navbera salên 2002-2012an de, salewaxt kêmzêde ji sedî 5, 2 rêjeya mezinahiyê bidestxist.
Ji ber qrîza darayî ya gerdûnî aboriya gelek welatan paşve çû. Lê di vê heyamê de, aboriya Tirkiyeyê, piştî hêdîbûna di aboriyê de ya di

2008an de û biçûkbûna di sala 2009an de, bi rêzê ve di sala 2010 û 2011an de bi rêjeya ji sedî 9, 2 û ji sedî 8, 8 ve leza mezinbûnê bidestxistiye û piştî Çînê leza mezinbûnê ya herî zêde a Tirkiyeyê. Tirkiye bi rêyaja mezinbûna aboriya xwe li Ewropa yê jî bû aboriya herî bilez mezinbûyî. Dema ku gelek welatên Ewropa yê qrîzek a aboriyê ya herî giran û teng dijiya, Aboriya Tirkiyeyê di sala 2012an de, bi rêjeyek ji sedî 2, 2 ve mezinbûna xwe domandiye.
Ev performansa mezinbûnê ya aboriya welêt, hatiniya neteweyê jî zêde kiriye. Hatiniya neteweyî ku di dawiya sala 2002yan de 230 mîlyar dolar bû, di deh salan de ji sê qatê zêdetir hatiye zêdekirin û derketiye 786 mîlyar dolaran. Di sala 2002yan de hatiniya neteweyî ya serê merivê 3.500 dolar bû, di dawiya sala 2012 an de ev hatinî
2002-2012
121
derket 10.504
dolaran.
Rêjeya enflasyonê
ya salane ku di sala
2002yan de li dora
ji sedî 30 an bû, ji
sala 2012an pêde
di Endeksa Bihayê
Xerîdarê de (TÜFE) ji
sedî 6.16, di Endeksa
Bihayê Hilberînerê
de jî (ÜFE) weke ji
sedî 2.45 pêkhatiye. Bi vî avayî li gorî daneyên TÜFE yê di 29 salên dawî de, li gorî daneyên ÜFE yê jî di 45 salên dawî de rêjeya herî kêm

a enflasyonê hatiye bidestxistin.
Rêjeya faîz a deyndayîna şevîn a Benqeya Navend a ku di sala 2002yan de li dora ji sedî 44an bû, di sala 2012an de hat daxistin heta ji sedî 5an. Bi vî awayî deh sal berê dewlet ji her sed lîreyê 86 lireyê wê dida deynê faîzê lê îro ji her sed lîreyê bitenê 16, 6 lîreyê dide deynên dewletê. Her wiha di sala 2002yan de rezervên dovîz a Benqeya Navendê ku 26.7 mîlyar dolar bû, bi zêdebûnek nêzî çar qet ve di dawiya sala 2012an de gihîştiye 100.3 mîlyar dolaran. Bi vî şeklî ligel rezerva zêrê rezerva Benqeya Navend bi tevahî bûye 120.3 mîlyar dolar.
Têkiliyên Tirkiye û Fona Pere ya Navneteweyî (IMF) di sala 1961an de dest pê kir. Tirkiye di dîroka xwe de herî zêde di salên 2000, 2001, û 2002yan de yanê beriya qrîza aboriyê a 2001an û pişte vê qrîzê deyn sitandiye. Ji ber vê deyndariyê, Tirkiye ketiye nav welatên ku ji IMFê herî zêde deyn standine. Di sala 2002yan de ji IMF ê re deynên qrediyê 23.5 mîlyar dolar bû, lê di deh salên dawîn de bi saya encama disîplîna darayiya gelemperîyê û îstîxrara aboriyê di Berfanbara 2012an de ev deynên qrediyê heta 900 mîlyon dolarê hatiye daxistin.
Rêjeya enflasyonê ya salane ku di sala 2002yan de li dora ji sedî 30 an bû, ji sala 2012an pêde di Endeksa Bihayê Xerîdarê de (TÜFE) ji sedî 6.16, di Endeksa Bihayê Hilberînerê de jî (ÜFE) weke ji sedî 2.45 pêkhatiye. Bi vî avayî li gorî daneyên TÜFE yê di 29 salên dawî de, li gorî daneyên ÜFE yê jî di 45 salên dawî de rêjeya herî kêm a enflasyonê hatiye

bidestxistin.
Şoreşa Bêdeng
122
Ji meha Gulanê ya sala 2013yan pê ve deynê qrediyê yê ji IMF ê re hatiye sifir kirin.
Di heyamên dawî de bi lihevhatin û peymanên vîzeyan Tirkiye bêtir berê xwe daye dinyayê. Tirkiye bê vîze dikare têkeve 63 welatan, li deriyê sinor a 11 welatan jî bi hêsanî dikare vîzeyê werbigire. Bi saya vê hêsaniyê Tirkiye, erdnîgariya xwe ya abaoriyê her ku diçe zêdetir fireh dike. Di encama vê yekê de, derfirotina ku di sala 2002yan de 36 mîlyar dolar bû, bi zêdebûnek çar qatî di sal 2012an de gişştiye 152 mîlyar dolaran. Sektora mutehîtiyê ya me, di razemeniyên derveyî welêt de rolek sereke dilîze. Sektora mutehîtiyê heta dawiya sala 2012an, ji Balkanan heta Asyaya Navîn, Ji Rûsyayê heta Rojhilata Navîn û heta Efrîqayê di 5 parzemînan de li 100 welatan bi bihayê 242 mîlyar dolaran nêzî 7000 hezar proje li ser xwe girtiye. Ji sala 2012an pêve Tirkiye di nav 225 şirketên mutehîtiyê a herî mezin a cihanê de piştî Çînê bi 33 fîrmayê a xwe ve di rêza duyemîn de cih digire.
Mezinahiya aboriya Tirkiyeyê li dinyayê di rêza 17mîn li Ewropayê jî di rêza 6emîn de ye. Bi saya vê serkeftinê di nav welatên G-20ê de ku aboriyên herî xurt ên cihane temsîl dikin de cih digire. Ji bo ku astengîyên burokratîk hema bêje ji bînê hatiye rakirin, di pergala bacê de serastkirin hatine çêkirin, piştgirîdayîna transferên karê û bi saya arizîkirina bernameyên serkeftî, li dinyayê bûye navendek

sermayê xistinê ya herî girîng ya di rêzên ewil de. Ji aliyê bazirganî û razemeniyên biyanî ve taybetmendiya Tirkiyeyê ew e ku ji Ewropa, Rojhilata Navîn, Efrîqaya Bakûr û Asyaya Navîn re deriyên wê vedibin. Lewra ji Stenbolê bi firîna bi çar saatan zêdetirî bi 50 welatan re û bi bazara berfireh a ku ji çar paran parek aboriya dinyayê pêktîne re ragihandin pêk tê.

Ji meha Gulanê ya sala 2013yan
pê ve deynê qrediyê yê ji IMF ê re
hatiye sifir kirin.

2002-2012

123

Tablo: 1. Aboriya Tirkiyeyê (2002/2012)

Rêz	Nîşaneyên Aborî	2002	2012
1	Hatiniya Netewî a Bitevahî	230 Milar Dolar	786 Milyar Dolar
2	Hatiniya Netewî a Serêmerivê	3.500 Dolar	10.504 Dolar
3	Enflasyon	% 30	%6.16
4	Rêjeya Faîz a Deyndariya Şevîn a Benqeya Navendî	%44	%5
5	Deynên Fona Père a Navneteweyî	23.5 Milyar Dolar	900 Milyon Dolar (Qanûna 2012an)*
6	Rezervên Dovîzê a Banqeya Navendî	26.7 Milyar Dolar	100.3 Milyar Dolar

7 Hejmarên Derxistiniyê 36 Milyar Dolar 152 Milyar Dolar
*(Ji dîroka 14.05.2013an pêve deynê qrediyê ya ji Fona Pere a Navneteweyî re hatiye sifirkirin)
Pêngavên Di Warê Tendûristiyê De Hatin Avêtin
Nexweşxaneyên Saziya Sigortayên Civakî (SSK) û nexweşxaneyên dewletê, di bin banê Wezareta Tendûristiyê de hatin yekkirin. Bi vî awayî welatîyên ku berê girêdayî Sindoka Teqawîdiyê, SSK û BAĞKURê bûn piştî vê serastkirinê êdî dikarin hemû nexweşxaneyan bi kar bînin.
Ligel destpêkirina sepandina hekîmiya malbatê êdî hemû welatî wê bê pere her tim di bin nêrîna dixtor de bin. Di newxweşxaneyên Gelemperîyê de 'Ûniteya Mafên Nexweşan' hatine damezrandin. Ji bo ku tendûristiya gel bê parastin li cihcihên girtî kişandina cixareyê hatiye qedexekirin.
Bîrokrasiya di pergala tendûristiyê de hatiye daxistin herî jêr her wiha qirtasiyevanî ji holê hatiye rakirin, ji bo ku welatîyên me bi nimreya nasnameya xwe a Komara Tirkiyeyê hemû nexweşxaneyan bi kar bînin derfet hat anîn. Ji bilî vê bi telefon û malperê jî ji saziyên Şoreşa Bêdeng
124
tendûristiyê sepandina standina randevûyê hatiye destpêkirin. Hemwelatî girêdayê Sindoqa Teqawîdiyê, Saziya Sigortayên Civakî (SSK) anjî BAĞKURê, girêdayê kîjan dibe bila bibe, êdî dikarin dermanên xwe ji hemû dermanfiroşan bistînin û di bihayên dermanê de li dora ji sedî 80 daxistin hatiye kirin. Dermanên newxweşê razandî jî, ji aliyê nexweşxaneya ku têde radizin ve êdî tên dayîn.
Di navbera salên 2002-2012an de 611ê wê newxweşxane, 1523 hê wê saziya tendûristiyê a asta yekem bi tevahî 2134 tesîsên tendûrîstiyê yên

nû hatine avakirin.
Di sala 2002yan de li
Tirkiyeyê, li Wezareta
T e n d û r î s t i y ê
256.000 personelên
tendûrîstiyê hebûn,
ev hêjmar di sala
2012an de nêzî du
qat hatiye zêdekirin
û derketiye 507.000 an. Cudatiya di navbera bajarên ku hejmara nexweşan dikevin para dixtorekî herî zêdeye û herî kême, di sala 2002yan de ji 13 yî 1 bû, ev rêje di sala 2012an de bû ji 3 yî 1. Di heyama deh salên dawî de kontenjana Fakûlteyên Tıpê derketiye du qatan kontenjana Dibistanên Bilind ên Birînpêç-Hemşîretî yê jî derketiye sê qatan.
Di 2002yan de, li Tirkiyeyê xerceneya tendûrîstiyê a serê merivê 330 dolar bû û para vê ya di nav hasilaya navwelat a gayrîsafî de ji sedî 3, 8 bû. Di 2012an de xerceneya tenduristiyê a serê mirovek derketiye 789 dolaran, û para vê perê a di nav hasilaya navwelat a gayrisafî de jî derketiye ji sedî 4, 4 an.
Ji bilî nexweşxaneyên dewletê li nexweşxaneyên taybet jî bê pere dayîna xizmetên lênerîna giran û bilez hat pêkxistin. Wexta muayeneyê a nexweşek serê merivê ji du qatê zehftir zêde bû û ji 4, 5 deqqeyê derketiye 9, 5 deqqeyê. Di nexweşxaneyan de ji odeyên di sala 2002yan de di dezgehên
tendûristiyê yên asta 1., 2. û 3. ku
girêdayî Wezareta Tendûristiyê
ne de, ji her 5000 kesan re

polîklînîkek diket, lê ji 2012an
pêve ji her 1.500 kesan re odeya
polîklînîkê dikeve.
2002-2012
125
tîpa koğûşê derbasî odeyên nûjen hatin kirin. Di 2002yan de rêjeya nivînên nûjen tenê ji sedî 6, 6 bû, di dawiya sala 2012an de ev rêje derketiye ji sedî 34 an.
Li aliyê çolterê sepandinên nexweşxaneyên mobîl û dermanxaneyên mobîl hatiye destpêkirin. di rojê de 126 hezar welatîyê me ji xizmetên tendûristiyê ên môbîl, 20 hezar welatîyê me jî ji sepandina dermanxaneya mobîlê sûd wergirtiye.
Di encama van geşedanan de, di sala 2002yan de di dezgehên tendûristiyê yên asta 1., 2. û 3. ku girêdayî Wezareta Tendûristiyê ne de, ji her 5000 kesan re polîklînîkek diket, lê ji 2012an pêve ji her 1.500 kesan re odeya polîklînîkê dikeve.
Êdî welatîyên me girêdayi Sindoqa Teqawîdiyê be jî girêdayi BAĞKURê anjî Saziya Sigortayên Civakî (SSK) be jî dikarin ji hemû saziyên taybet yên tendûristiyê sûd werbigirin. Di sala 2002yan de li Tirkiyeyê 271 nexweşxane hebû, di dawiya sala 2012an de ev hêjmar derketiye 541 an. Di pêvajoya deh salan de qapasîteya nivînê a nexweşxaneyên taybet bi zêdebûnek sê qatî ve gihîştiye dora 35.000an.
Hejmara wesaîta hewarê (ambulans) ku di 2002yan de 618 bû, di sala 2012an de derketiye 3346an. Hejmara stasyonên midaxeleya bilezgin ku 481 bû, derketiye 1863an. Ji sala 2012an pêve ji bo ku ji rewşa lezgîn re bilez midaxele bê kirin 17 firok, 4 ambulansên balafir, 4 ambulansên behrê û bi 291 wesaîta
hewarê ya bi paleta

berfê ve berdewamiya
xizmetê tê kirin.
Di deh salên dawî
de, rêjeya mirinê a
dayik ji sedhezarî
64 an daket 15, 6 a,
leza mirina pitika jî ji
hezarî 31, 5 an hatiye
Di deh salên dawî de, rêjeya
mirinê a dayik ji sedhezarî 64 an
daket 15, 6 a, leza mirina pitika jî
ji hezarî 31, 5 an hatiye daxistin ji
hezar 7, 5 an. Welatên ku hatiniya
wan jî wekî Tirkiyeyê maweya
jiyanê a tê payin, di pêvajoya
navbera 2000-2009an de du sal
dirêj bûye, li Tirkiyeyê jî ev mawe
pênç sal dirêj bûye.
Şoreşa Bêdeng
126
daxistin ji hezar 7, 5 an. Welatên ku hatiniya wan jî wekî Tirkiyeyê maweya jiyanê a tê payin, di pêvajoya navbera 2000-2009an de du sal dirêj bûye, li Tirkiyeyê jî ev mawe pênç sal dirêj bûye.
Pêngavên Ji Bo Ewlehiya Civakî û Tenduristî Ya
Welatiyan Hatin Avêtin
Di heyama deh salên dawî de di warê ewlehiya civakî û tendurîstiya welatîyan de pêngavên gelek girîng hatin avêtin. Di vê çerçoveyê de reforma herî girîng ku hat avêtin ew e ku hemû saziyên ewlehiyên

civakî (Sindoqa Teqawîdiyê, Saziya Sigortayên Civakî, BAĞKUR) di bin banê “Saziya Ewlehiya Civakî (SGK)” de kom bûn.
Di tendûrîstiyê de derbasî pergala ku dewletên pêşketî disepînin, pergala “Sîgorteya tendûristiyê a Giştî“ ku ji sedî 18 ê nişteciha dinyayê dihewîne hat kirin. Piştî kirariyên testa hatiniyê a sigorteya tendûristî a Giştî, prîmê zêdetirî 9 milyon me yên welatîyên ku hatiniya wan a brüt, di bin asta 1/3 ê hatiniya kêmtirîne, ji aliye dewletê hatiye dayîn. Di vê warê de ku bi rêjeyek ku li pêşiya gelek welatan cih digire, ji sedî 98 ê welatîyên me hat hildan bin banê Sîgorteya Tendûristiya Giştî. Dîsa ku li dinyayê li tu welatek mînaka vê yekê tune, ji hemû kesên di bin temenê 18 saliyê re, dê û bav bê sîgorte be jî, dest bi xizmeta tendûrîstiya bê pere hatiye kirin. Ji bilî vê mafên tendûrîstiyê ên kesên xîzan, bi ên kesên sîgorteyiyan re gihîştiye heman astê.
Rêjeya prîm a esnaf û cotkaran, ji sedî 40an hatiye xistin ji sedî 33, 5 an wekî karkeran, cotkar û esnafên ku qezaya kar derbas kiribin ji wan re hem mehanî hatiye girêdan hem jî dayîna nikare kar bibîne ya demkî jî hatiye dayîn. Cotkar û esnafên ku wefat kirin ji keça wan li dinyayê li tu welatek mînaka vê yekê tune, ji hemû kesên di bin temenê 18 saliyê re, dê û bav bê sîgorte be jî, dest bi xizmeta tendûrîstiya bê pere hatiye kirin.

ya sêwî re jî bi meblaxa heta bîst û çar mehan arîkariya cihêzê tên dayîn. Esnafê ku deynê wî yê qrêdiyê hebe li şûna mehrûmkirina ji qrediyê, ji qrediya ku tê dayîn sepandina mahsûpkirina deynê prîmê hatiye anîn. Ji aliyê din ve ji bo li hember bobelat û afatên xwezayî cotkaran biparêze wek cara ewil sepandina “Sîgorteya Çandiniyê “ hatiye destpêkirin, ji derfetên tenduristiyê sûd wergirtina dê û bavê kesên teqawîd û sîgorteyiyên çandiniyê jî hat pêkxistin.
Ji karmendan re şûna hevdîtina komî derfeta hevpeymaniya komî hatiye anîn. Bi vî awayê ji peywirdarên gelemperîyê re cara yekem “Mafê Peymaniya Komî” hatiye dayîn. “Qanûna Sendîqayên Gelemperîyê“ ku sendîqavaniya gelemperîyê digihijîne normên nûjen hatiye derxistin.
Ji aliyê pergalên girêdana mehaniyê ve ji bo bêdadiya di navbera mehaniyên teqawîdan de ji holê were rakirin di sala 2012an de Zagona Întîbakê têket merîyetê. Ji vê zagonê bi tevahî 1.783.708 kes sûd wergirtiye.
Zêdekirina Hejmara Balafirgeh Seferên Hewayê û
Rêwiyan
Li Tirkiyeyê hêjmara balafirgehên çalak di sala 2003yan de 26 bû, ev hêjmar di sala 2012 î de derketiye 49 î. Balafirgehên heyî jî hatine nûkirin û nûjentir bûne.
Di serê salên 2000an de ji aliyê Rêhewaya Tirk (THY)bi tenê ji 2 navendan heta 26 noqteyê seferên navwelêt dihat kirin. Ligel piştî ku sektorên taybet jî di xetên navwelêt de dest bi seferên bi terîfe kirin, ji dawiya sala 2012an pê ve bi 6 rêhewayê ji 7 navendan ji 49 niqteyan re firîn pêk tê.

Hejmara welatan ku bi Tirkiyeyê re peymana ragihandinê a hewayê heye, di deh salên dawî de ji 81an derketiye 143an; hêjmara noqteya firînê jî ku ji Tirkiyeyê pêktê ji 60an derketiye 192an.
Şoreşa Bêdeng
128
Li gorî daneyên
Wezareta Gihandin,
Behrevanî û
Ragihandinê; trafîqa
balafirê ya li gştiyê
Tirkiyeyê di deh
salên dawî de ji sedî
160 zêde bûye, di
dawiya 2012an de
gihîştiye mîlyonek
376 hezar 486an.
Di 2002yan de di xetên hundirîn de 8.5 mîlyon kes rêhewayê bi kar aniye, di sala 2012an de ev hêjmar gihîştiye 64.6 mîlyonan. Di xetên derve de jî hejmara rêwiyan ku li dora 24 mîlyonê bû, gihîştiye 65.6 milyonê. Bi vî awayî di tevahiyê de hêjmara welatîyên ku bi balafirê rêwîtîyê dikin di 2002yan de 32.5 mîlyon bû, di 2012an de ji 130 mîlyonê derbas bûye. Ji bilî vê yekê di heyama deh salên dawî de, ji deh mîlyonan zêdetir welatî cara yekem bi balafirê rêwîtîye kirine. Zêdebûna li herêmên Rojhilat û Başûrê Rojhilatê bi taybetî balê dikşîne. Li van herêman hêjmara seferên balafirê ên hûndir û derve bitevahî di 2002yan de 16.724 bû; di sala 2012an ev jimar gihîştiye 73.987an. Di çerçoveya vê zêdebûnê de hêjmara rêwiyên di xetên navwelêt de çûn û hatin di 2002yan de li bajarên herêmê bi tevahî

883.675 bû, di sala 2012an gihîştiye 7.864.785an, di 2002yan de hêjmara rêwiyên hatin û çûn ên xetên derve ku 66.39 bû tevahiya wê jî gihîştiye 273.476an.

Hêsankirina Trafiqa Rêbêjeyî û Zêdekirina Rêyên Dabeşkirî

Bi armanca daxistina asta herî hindik ya qezayên trafîqê yên li ser rêbejan pêk tên û ji bo bilindkirina asta xizmetê ku ji ber kêmasiyên nebûnê daketibû di deh salên dawî de bi razemeniyek nêzî 85 mîlyar

Di 2002yan de di xetên hundirîn de 8.5 mîlyon kes rêhewayê bi kar aniye, di sala 2012an de ev hêjmar gihîştiye 64.6 mîlyonan. Di xetên derve de jî hejmara rêwiyan ku li dora 24 mîlyonê bû, gihîştiye 65.6 milyonê. Bi vî awayî di tevahiyê de hêjmara welatîyên ku bi balafirê rêwîtîyê dikin di 2002yan de 32.5 mîlyon bû, di 2012an de ji 130 mîlyonê derbas bûye.

2002-2012

129

Lîreyê, 16 hezar 152 kîlometre rêyên nav bajaran hatin çêkirin. Her wiha dirêjahya rêyên nav bajaran ku di sala 2002yan 6.101 kîlometre bû, di sala 2012an de gihîştiye 22.253 km yê. Hejmara bajarên ku bi rêyên parvekirî-rêyên nav bajaran bi hev re hatine girêdan ji şeşan gihîştiye 74 an. Dîsa di vê heyamê de Tirkiyeyê ku di barkêşiya navneteweyî de wezîfeya pirê dibîne, aksên xwe yên bakûr–başûrê yên ku deriyê sînorên xwe bi benderên xwe re gire dide û dirêjahiya wê 11 hezar 749

kîlometre ye, 8 hezar 823 kîlometreya wê hatiye temamkirin.
Ev zêdebûnên rêyên nav bajaran; trafîqa rêbejê ewlehtir, lezgîntir, bi tendûristî kiriye û xwezayê jî parastiye. Di deh salên dawî de sed mîlyon wesaît li gorî kîlometreyê, di rêjeya mirina di qezayên trafîqê de ji sedî 41kêmbûn pêkhatiye. Ligel daketina xerçkirina sotemeniyê û daketina wextê ku di rê de diçe, salane nêzî 10, 6 mîlyon TL tasarrûfek-ragirtin tê bi dest xistin. Bi saya vê tasarrûfa sotemeniyê qarbondîoksîtên ku tê berdan xwezayê salane 2, 33 mîlyon ton kêmbûn çêdibe.
Projeyên Trêna Bilez û Zêdekirina Dirêjahiya Rêyên
Hesin
Di rêhesinan de di deh salên dawîn de pêngavên girîng hatine avêtin. Bi saya vê Tirkiyeyê trêna bilez a bilind ku Japonya di 1957î de, Ewropa jî 1965î de dest bi şixûlandinê kiriye, di dîroka xwe de cara ewil, bi têketina xizmeta etaba Enqere-Eskîşehîrê di 13 Adar a 2009an de naskiriye. Di sala 2011an de jî xeta trêna bilez a EnqereKonyayê
temam bûye û ji xizmetê re hatiye vekirin. Înşaatên xetên trêna bilez a bilind a Enqere-Sêwas û Enqere- Îzmîrê jî berdewam dike. Ji sala heta îro bi giştî 888 kîlometre xeta trena bilez a bilind ketiye xizmetê. Bi vî awayî Tirkiye, di karsaziya Trêna Bilez a Bilind (YHT) de li dinyayê bûye 8emîn li Ewropa yê jî bûye 6emîn.
Dirêjahiya xeta sereke ya rêhêsina welatê me ku di sala 2003ye de 8845 km bû hat derxistin 9 hezar û 931 kîlometreyê. Ji bilî vê di vê heyamê de xetên Adana-Mersin, Eskişehir-Kütahya, Gaziantep-Şoreşa Bêdeng
130
Karkamış-Nusaybin di nav de bi giştî 7 hezar û 261 kîlometre xeta

rêhêsinê hatiye nûkirin.
Li welatê me dest hilberîna perçeyên trêna bilez û wesaîtên metro yên nûjen jî hatiye kirin. Bi tesîsên ku li Sakarya, Konya, Afyon, Erzincan, Karabük, Sivas û Çankırı hatin avakirin, êdî amûrên trêna bilez û trêna bilez li welatê me tê hilberandin.
Zêdekirin û Belavkirina Projeyên Avahiyên Komî
Ji sala avakirina xwe ya 1984î heta dawiya sala 2002yan ku ji ser nozdeh sal derbas bû, di vê demê de Serokatiya Îdareya Xaniyên Komî(TOKİ) nêzî ji mîlyonek xanî re desteka qrêdiyê da û 43.145 xanî ava kir. Di di deh salên dawîn de jî di çêkirina xaniyan de bi zedebûnek çardeh qatî gihîştiye jimara 582.895an. Ji van xaniyan ku li heştêh û yek bajar û heştsed navçeyan hatin çêkirin, ji sedî 85an zêdetirê wan di wesfa xaniyên civakî da ye. Ev projeyên ku di çarçoveya TOKÎ de tên çêkirin hem rasterast û hem neyekser îstixdamek bi 800 hezar kesî pêkaniye.
Di çarçoveya sepandina veguherîna bajaran de li 174 herêmên cuda xebata îxaleya bi 86.441 xanî hatiye kirin, di 151 projeyê de ku îxaleya wê temam bû 71.681 xanî hat destpêkirin û li 89 herêman înşaata 51.246 xaniyan temambûye û radestî li xwediyê wan hatiye kirin. Bi vî awayî xwediyên berbajar-şevnişînên li vir gihîştine xaniyên nûjen. Ji bilî vê ji bo welatîyên ku rastî afatê hatin sepandinek hat dest pê kirin. Li gor vê xaniyên wan kêmzêde di nav danzdeh mehan de dê bê çêkirin û paşê radestê ew kesên xwedî maf dê were kirin.
Di çarçoveya sepandinên pêşvebirina warên civakî de 907 dibistan a ku 20, 329 polên wan heye, 934 eywana werzîşê, 135 lib wargeh û pansiyon, 94 xalên tendûristiyê, 200 nexweşxane, 41 pîrtûkxane, 481 navenda bazirganiyê, 462 mizgeft, 27 malên hezê-şefqetê, 20 navenda jiyana bêasteng, 84 avahiya xizmeta giştî û 9 stadyûm hatiye

avakirin. Di çarçoveya sererastkirinên hawirdorê de jî nêzî 42 milyon
2002-2012
131
metrekare qada heşînahiyê, 15 mîlyon çikandina darê û peyzaja hêjik hatiye çêkirin. Di çarçoveya Îdareya Avahiyên Komî de biryara çêkirina 341 qereqolê hatibûn dayîn. Ji vê çêkirina 275 qereqolê hatiye dest pê kirin û 66ê wê jî di pêvajoya îhaleyê de ye.
Ji bilî van di deh salên dawî de ji bo projeyên binesaziya herêmên Rohilatê û Başûrê Rojhilata Anatolyayê ji aliyê Benqeya Bajaran razemeniyek nêzî 650 mîlyon TL, ji bo çêkirina tesîsa ava vexwarinê jî razemeniyêk bi 440 Milyon TL yê hatiye kirin.
Pişgirîdayîna Projeyên Ji Bo Binesaziyên Gundan
(KÖYDES)
Bi projeya Piştgirîdayîna Projeyên Ji Bo Binesaziya Gundan (KÖYDES)ê ku weke projeya pêşketina çolterê ya herî mezin a dîroka Komarê ye, di serî de li herêmên Rojhilat û Başûrê Rojhilatê jiyana welatîyên me yên ku li aliyê çolterê dijîn hêsan bûye û encamên girîng hatine bi dest xistin. Ji bo gundên ku ava vexwarinê û rêyên wan tune an jî rêyên wan têrê nakin, bi besker û bi tendûrîstî ava vexwarinê bê çêkirin û standardên gundan bên zêde kirin projeya KÖYDESê di sala 2005an de hatiye destpêkirin. Armanca projeya KÖYDESê ewe ku gundên me yên bi salane xizmeta ku heq dike nikare bistîne mexdûriyetên wan bên safî kirin, li gundan qalîteya jiyanê bên zêdekirin, ji aliyê aborî û civakê ve rewşa gundan pêşbikeve ye. Di çarçoveya vê projeye de, bi 8 mîlyar 428 mîlyon 49 TL dayînê ve, ku di navbera salên 2005-2013an de hatiye texsîskirin û di encama xebatên ku bi vê perê hatin kirin de, li giştiyê welêt ji hemû gundan re rê û ava vexwarinê ya bi tendurîstî hatiye.

Di çarçoveya projeya KÖYDESê de, heta sala 2013an, di rêyên gundan de 98.975, 2 km rêya esfalt (43.894 km esfalta qata yekemîn, 55.081, 2 km esfalta qata duyemin) 2.478, 7 km rêya beton, 74.546, 6 km rêya stabîlîze, 1.721, 5 km rêya xam, 5.284, 9 km tesviye, 32.953, 5 km temîrat, 10.831.629 m2
kevirê peyare hatiye çêkirin. Ji aliyê hunerê
ve 34.242 lib menfez, 1.248 lib pirê hatiye temamkirin. Di ava vexwarinê Şoreşa Bêdeng
132
de jî 4.175 gund û derên girêdayê gundan ku ava wan tunebû, gihîştin şebekeya ava vexwarinê. 43.952 gund û derên girêdayî gundan re jî ku ava vexwarinê kêm bû, tesîsên ava vexwarinê hatine nûkirin. Tesîsên ku ava vexwarînê hatiye çêkirin an jî tesîsên ku heyî hatine nûkirin li 48.127 gund û derên girêdayî gundan bi tevahî 13.301.682 welatîyê me dijin. Di sektora avdanî ya bi pîvana biçûk de jî çekirina 13 heb bêrmok(gol), 34 li tesîsa ji bêrmoka avdan, 370 heb tesîsa avdaniya sererdê 59 lib tesîsa avdan a binerd, 6 heb golên ava vexwarinê a heywanan hatiye temamkirin û ji 54.952 hektar qadê re xizmet hatiye birin û 58.042 malbat a cotkaran jê sûd wergirtiye.

Piştgirîdayîna Projeyên Ji Bo Binesaziya Şaredariyan
(BELDES)

Ji bo piştgirîdayîna binesaziya ava vexwarinê û rê yên şaredariyên ku nifûsa wan di bin 10 hezarî de ye, bi projeya ‘Piştgirîdayîna Projeyên Ji Bo Binesaziya Şaredariyan’ (BELDES) ku di salên 2007 û 2008 an de hat sepandin ji 2507 şaredariyan re 633.5 mîlyon TL çavkanî hatiye dayîn.

Bi vê çavkaniya ku hate dayîn di sektora rê de 24.120.181 m2
kevirê

kilîtê, 2.880 km rêya esfalt, 2.652 km rêya stabîlîze, 312 km rêya beton, 61.252 m3
dîwarê kevir, 133 lib pirê, 478 qewar(menfez) hatiye
çêkirin. Di sektora ava vexwarinê de jî 775 tesîsên nû, geşkirina 399 tesîsan, 165 temîr jî bitevahî li 1.339 şaredariyê xebata avavexwarinê hatiye çêkirin, bi van xebatan ve bitevahî ji 3.267.932 welatîyên me re xizmet hatiye birin.

Programa Piştgirîdayîna Civakî (SODES)

Ji bo sermayeyên bajarên li herêmên Rohilat û Başûrê Rohilatê bê xurtkirin, pêdiviyên civakî yên ku ji ber qoçberî, xizanî û bêkariyê derketiye holê bê safî kirin û desteka pêvajoya hevgirtina civakê bê kirin; di sala 2008an de Programa Piştgirîdayîna Civakî (SODES) ketiye merîyetê.

2002-2012

133

Di navbera salên 2008-2012an de di çarçoveya bernameyên SODESê ya ku li 30 bajaran hat meşandin de, heta îro di warên îstixdam civak çand-huner-werzîş de nêzî 674 proje têketiye jiyanê. Di sala 2013yan de çarçoveya bernameyê belavî 34 bajaran bûye.

Ajansên Pêşketinê

Ji bo ku di navbera hêla gelemperî, hêla taybet û dezgehên civaka sivîl de yekîtîya kar bê geşkirin û potansiyela devertî bikeve tevgerê bi saya Ajansên Pêşvketinê ku ji sala 2006î pêde dixebite û di sala 2009an de pêvajoya avadaniya xwe qedandiye û hêjmara wan gihîştiye bîstûşeşan, ji aliyê kêmkirina cudatiya pêşketinê a navbera herêman û nav herêm ve pêşketinên girîng hatine bidestxistin. Ajansên Pêşveçûnê ku anha 795 ê wî personelên pispor, bi tevahî 995 kes tê de dixebite; di heyama 2008-2013an de bi bangewaziya

pêşniyarî a projeyan, ji sazî û dezgehên gelemperîyê kargeriyên devertî, zanîngehan, saziyên civaka sivîl û ji karsaziyan 26.000 serîlêdanên projeye standiye. Di encama nirxandinên bê alî û rast de 4670 proje hatiye destekkirin û ji van projeyan re li ser 900 mîlyon TL yê çavkanî hatiye bikaranîn. Ligel bi meblaxa fînansmana denk a ji bo projeyên pêşketinê çavkaniya ku hate bikaranîn nêzê 1, 8 mîlyar TL ye. Ajansên Pêşveçûnê gelek veberdêrên xwemalî û biyanî jî kişandine herêmê. Bi tevahî ji 7 Ajansên Pêşketinê a ku li herêmên Rohilat û Başûrê Rojhilatê Anatolyayê hatiye damezrandin di heyama 2009-2012 an de 338.677.000 TL çavkanî hatiye veqetandin.

Têkoşîna Bi Xizaniyê Re û Sepandinên Alikarî û Pişgirîdayîna Civakî

Bernameyên piştevanî û alikariya civakî yên di heyamên berê de dihat sepandin, hem ji ber biçûkbûna girseya di hedefa wê de hem jî ji ber ku di kêmkirina xizaniyê de bandora wê têrê nedikir, encamên dihat xwestin bi dest nexistin. Ji aliye din weke pêwistiya dewleta civakî ji bo hin aliyên civakê ku divê eleqeyek taybet lê bê dayîn

(zarok, pîr û kal, astengdar) sepandinên alîkarî û dayîna civakî di astek baş da nebû.

Di heyama deh salên dawî de sepandinên bi xîzaniyê re têkoşîn û destek/alîkariyên civakî û pêkxistina dad a civakî, başkirina belaviya hatiniyê, ji welatîyên me yên ku bipiranî li paş piyeseya îstixdamê de mane û di rewşek xîzan/mihtac de dixuye re ji bo ku rewşa wan a civakaborî

bê başkirin û di
bin rêjeya xîzaniyê de
nemînin pêşketinên
gelek girîng hatine
bidestxistin. Ji bilî vê di çerçoveya dewleta civakî de, ji bo zarok, pîr û kal, astengar, sêwî û jinebiyên şehîd û xaziyan bernameyên nû hatine geşkirin û ji bo dad a civakî û engeya civakî pêkwere pêngavên gelek girîng hatine avêtin.
Di encama polîtîkayên aborî yên bi îstîxrar hatin sepandin, razemenî û alîkariya civakî de di sala 2002yan de hêleke civakê ku mirovên tê de mecbûr bûn bi 4, 3 dolarê rojeke bijiyana ji sedî 30, 3 yê nifûsa komî digirt. Di sala 2011an de ev rêje heta ji sedî 2, 79 an ketiye. Her wiha di sala 2002yan de di warê arîkariya civakê û xizmeta civakê de mîqtara çavkaniya ku hate bi kar anîn 1, 3 mîlyar TL bû, di dawiya 2012an de ev mîqtar nêzî 15 qet bilind bûye û gihîştiye 20 mîlyar TL yê. Bi vî awayê arîkarî û xerceneyên xizmetê ji GSYH re rêjeya wê di sala 2002yan de ji sedî 0, 5 bû, di dawiya sala 2012an de ji sedî 1, 4 an hatiye bilindkirin.
Di encama van geşedanan de, di rejeya xîzaniyê de kêmasiyek berbiçav pêkhatiye û bi xîzaniyê re têkoşîna stratejîya Tirkiyeyê, ji “bi xîzaniyê re tekoşîna teqez”, berê xwe daye aliyê “mîhvera pêşketina mirovî” ya ku li gelek welatên OECDê tê sepandin.
Di pîvana hewcetiya pêdivî û xizmetê de programên alîkariya civakî û destekên civakî yên cuda, nû û berfireh hatiye sepandin hema hema
2002yan de hêleke civakê ku
mirovên tê de mecbûr bûn bi 4, 3
dolarê rojeke bijiyana ji sedî 30,
3 yê nifûsa komî digirt. Di sala
2011an de ev rêje heta ji sedî 2, 79

an ketiye.
2002-2012
135
hemû welatîyên me yên ku hewcetiya wan bi van xizmetan hene di nav van bernameyan de hatine girtin. Di van bernameyên berbiçav de;
· Ji hemû xwendekarên dibistana ewil û navîn re bêpere dayîna pirtûkên derse,
· Ji bo nêzî 3 mîlyon zarok ji dayikan re bi bernameya “Alîkarîyên Tenduristiyê yên Bi Şert û Perwerdehiya Bi Şert” ve dayîna neqdê ya birêkûpêk.
· Di perwerdehiya bi kişandin de mesrefa firavînê a nezîkî 600 hezar xwendekaran tê dayîn(dabînkirin).
· Nêzîkî salane 43 hezar xwendekar yên astengdar bêpere tên birin û anîn dibistanên wan,
· Bi nav hevkariya bi TOKÎyê re ji bo malên xîzan xaniyên civakî hatine avakirin.
· Ji zêdetirî 2 mîlyon xaniyan re her sal weke birêkûpek arîkariya şewatê tê kirin,
· Ji nêzî 240 hezar jin re ku hevserên wan wefat kirine, bi rêkûpêk dayîna alîkariya madî,
· Salane nêzîkî ji bo 40 hezar zarok ji malbatên wan re dayîna pişgirîya civakî û aborî,
· Bi navginiya Saziya Hîndekariya Bilind û Wargehên Qrediyê ji zarokên xîzan ên ku hîndekariya bilind duxwînin re dayîna bûrsê,
· Ji bo arîkariya civakî bê standin welatîyên ku serîlêdan û an jî yên dikarin bixebitin qeyda wan li Saziya Dîtina Karker û Karê (İŞKUR) ê hatiye çêkirin û bi saya vê ji wan re kar hatiye dîtin(di vê çarçoveyê

de di nav sala 2012 an de 23 hezar kes ketiye kar, 69 hezar kes hat hildan qûrse û 39 hezar kes ji sîgorteya bêkariyê sûd wergirtiye),
Şoreşa Bêdeng
136
· Kêmzêde salane ji 1, 2 mîlyon welatîyên me yên astengdar, pîr û kal re weke birêkûpek arîkariya madî ku di navbera 125-375 TL de diguhere tê dayîn.
· Salane ji bo xizmeta lênêrîna kêmzêde 410 hezar welatîyên me yên astengî giran, nêzî mûçeya asgarî sepandina mehaniya lênerînê a li malê tê meşandin,
· Dayîna lêçûnên perwerdehiya taybet ên welatîyên me yên astengdar,
· Di bin banê sazî de her sal ji bo nêzî 14 hezar zarok, 11 hezar pîr û kal, 5 hezar astengdar û ji 2 hezar jin re xizmet tê dayîn,
· Ji malbatên hewcedar yên eskeran re destpêkirina bernameya alikariya neqdî,
· Bi projeyên ku hatinî tîne û bi armanca civakînin ve gihîştina hatiniyek birêkûpêk yên welatîyên me
· Sepandina ‘’ Sîgorteya Tendûrîstiyê a Giştî’’ ku li gelek welatên Ewropayê û Ameriqayê nekarîn bi awayek baş têxin merîyetê, têket jiyanê. Bi saya vê sepandinê naveroka ewlehiya tendûrîstiyê hat berfirek kirin û prîmên sîgorteyê yên ji 9 mîlyonî zêdetir welatîyên me yên hewcedar ji aliyê dewletê ve tê dayîn.
wekî van gelek arîkariyên civakî û programên piştevaniya civakî di nav deh salên dawî de derbasî jiyanê hatiye kirin an jî naveroka wê hatiye berfirehkirin. Nêzî ji sedî 90 bernameyên alîkariyê yên hatin behs kirin li ser bingeha mafê tê sepandin.
Ji bilî van sepandinan, ji bo pêdiviyên welatîyên me yên xîzan

û hewcedar bên cih bi navgîniya “Weqfên Pişteyanî û Alîkariya Civakî” ku li her bajar û navçeyê hatiye damezrandin, bi armanca ku welatîyên me bigihijîn hatiniyek mayinî piştgirîyên projeyan tê dayîn. Ji bernameyên alikariyê yên civakî yên bi navginiya 973 Weqfên Pişteyanî û Alikariya Civakî ya li giştiyê welêt ve tên sepandin, heta 2002-2012

137

dawiya sala 2012an li 2.101.611 malan bitevahî 6.370.100 kes sûd wergirtine.

Ji bilî vê ji bo ku welatîyên me bi hêsanî bigihîjin xizmetê û pergala alikariya civakî bandordar bibe ;

· Pergala Agahdariya Alîkariya Civakî (SOYBİS) hat dest pê kirin,

· Xeta Banga Alîkariya Civakî (144) hat damezrandin,

· Ji bo dîyarkirina bikarvanên alîkariya civakî geşkirina formûla pûankirinê,

· Li Weqfên Alîkariya Civakî û Pişteyaniyê yên li giştiyê welêt personêlên bi wesif hatine îstixdamkirin û hêjmara personelan derketiye nêzî 9.000 an,

· Pergala Agahiya Xizmetên Alîkariya Civakî ya Bitûnî û di warê alîkariya civakî de envantera xîzanî ya navendî hatiye damezrandin

bi van sepandinan, di warê alikariya civakî de wekî pirsgirêkek kronik dûpatkirina tunebûna bingehek daneyê a entegre, di tesbîtkirina hewcetiyê de bikaranîna qrîterên ne objektif û dirêjbûn û bi zehmetbûna pêvajoya gihîştina xizmetan ji holê hatine rakirin. Bi xebatên hatin kirin û sepandinên têketin merîyetê ve bi awayek bibandor şefaf û bilez gihîştina girseya hedef ya xercaneyên gelemperîyê yên bi armanca civakî hat pêkxistin.

Pêngavên Ji Bo Xizmên Şehîd, Xazî û Ji Bo Mexdûrên
Terorê Hatin Avêtin
Ji bo ku xizmên şehîd û xaziyên me derbara jiyana xwe bi rûmetî qezenç bikin û bidin berdewamkirin, bi her aliyan ve piştgirîya madî û manevî hatiye kirin. Di vê çarçoveyê de mafê îstixdamê yên ji bo xizmên şehîdan di yek carê de du qat hatiye bilindkirin di nav kesên ku dikarin vê mafê bikar bînin de ji bilî hevsera şehîd,
Şoreşa Bêdeng
138
zarok, xwişk û birayê
wî, êdî dê û bavê wan
jî hene. Şerta seqetî
û hewcetiyê ya ji bo
dê û bavê şehîdan
jî hatiye rakirin. Ji
mehaniya dê û bavê
şehîdan re astek
hatiye anîn(mûçeya asgarî ya meblaxa zelal) û mehaniya wan hatiye bilindkirin.
Di mehaneyên xizmên şehîd û xaziyan de bi sepandina mehaneya emsal ve kêmasî newekhevî û tengasî ji holê hat rakirin. Dema mehane li xizmên er û erbaşên ku şehid an xazî bûnê bên girêdan, li rewşa perwerdehiya wan êdî nayê nêrîn û mehaneya hemûyan hatiye serastkirin. Her wiha di hesapkirina mehaneya eskerên ku di bûyerên terorê de şehid ketine anjî xazî bûne de cudakariyeke pozîtîf hatiye kirin û mehaneyên wan hatine zêdekirin.
Ji xizmên şehidên bûyerên terorê û xaziyên terorê re di dema bexşa gayrîmenkulê de jêbexşîn hatiye kirin. Ji bo ku xizmên şehidan û xazî

bê pirgirêk wesaitên rêwîtîyê yên komî bikarbînin hin serastkirin hat kirin û tengasî hatin safî kirin

Welatiyên me yên sivîl yên dema çalakiyên terorê derdixistin holê, bandora wê kêm dikirin anjî çalakiyê bêtesîr dikirin jiyana xwe ji dest dane anjî seqet mane hat hildan bin banê qanûna ku mafên şehîd û xaziyan dihewîne. Ji ber çalakiyên terorê an jî di dema têkoşîna terorê re de ji sivîlên ku seqet mane re, ji xizmên sivîlên ku jiyana xwe ji dest dane re ji bo ku mexdûriyeta wan bidawî bibe mehani hatiye girêdan. Bi heman awayî, desteka ku tê dayîn xaziyên me yên ku bê alîkariya tu kesî nikarin bijîn û lixwe binêrin, ji parezkarên gund û welatîyan re jî hatiye dayîn û ev pişgirî hat derxistin du qatê mûçeya asgariyê.

Welatiyên me yên sivîl yên dema
çalakiyên terorê derdixistin holê,
bandora wê kêm dikirin anjî
çalakiyê bêtesîr dikirin jiyana xwe
ji dest dane anjî seqet mane hat
hildan bin banê qanûna ku mafên
şehîd û xaziyan dihewîne.

2002-2012

139

Hat armanckirin heta ku seqetiya giran a sivîl û xebatkarên dewletê ku di dema têkoşîna terorê de birîndar bûne eşkere bibe, ew kes bê pere ji hemû xizmetên tendûristiyê û dermankirinê sûd werbigirin. Ji bilî xaziyên terorê xaziyên ku seqetiya wan girane ji bo ku di pêvajoya tedawiyê de hemû pêdiviyên van kesan mînak amûrên wek ortez/ protez bêpere ji aliye Saziya Ewlehiya Civakî bê dayîn verastkirin hat kirin.

Ji xizmên şehîd û xazî re çerçoveya alîkariyên civakê hat berfirehkirin,

bêyî ku li hatinî û ewlehiya wan a civakî hat nêrîn, ji afatzede, xizmên şehîd û xaziyan re ku alîkariya civakê bê kirin derfet hatiye anîn.

Pêngavên Ji Bo Hêsantirkirina Jiyana Astengdaran

Di pêvajoya deh salî de, bi armanca geşkirina mafên astengdaran verastkirinên girîng hatine kirin û çavkaniya ji bo xizmetên astengdaran bi awayek girîng hatiye zêdekirin. Di sala 2005an de, '' Qanûna ku Ji bo Astengdaran û Di Hin Qanûn û Di Biryarnameyên Hukmê Qanûnê de Guhertin Pêş Dibîne" hat qebûlkirin. Bi vî awayî di bingeha destlênedayîna rûmeta mirov de, li dijî her cûre îstîsmarkirina astengdar û astengdariyê geşkirina polîtîkayên civakê, bi cudatiyê re têkoşînkirin û ji bilî vê beşdarbûyina astengdaran a li mekanizmayên biryarê hat armanc kirin û bi vî şeklî mafê astengdaran hêj zelal û berbiçav bû. Di sala 2008an de jî "Peymana Derbarê Mafên Astengdaran a Neteweyên Yekbûyî" ku ji bo kesên astengdar derfeta ji maf û azadiyan bi awayekî tam û wekhev sûd wergirtin tîne û ji dewletên vê peymanê qebûldikin re jî berpirsiyariyên wek ji holê rakirina her cûre cudaxwaziyê û bilindkirina standartên jiyana wan tîne hat qebûl kirin.

Tevdîr û teşwîqên ku îstixdama astengdaran pêşdibe hatin sepandin. Ezmûnên girtina karmendiya dewletê ya astengdaran êdî ji aliyê sazî û dezgehên dewlete ve cuda cuda nayên kirin, bi guhertina qanûnî ya di sala 201î de hat kirin ve ji bo astengdaran ezmûnek cuda û navendî hat pêş dîtin. Li gorî encama ezmûnên 2012an, 2174 mezûnê

Şoreşa Bêdeng

140

dibistana navîn, 1093 mezunê lisansa pêşîn, 999 mezûnê lîsansê li qadroyên guncaw hatin bicihkirin. Di ezmûna 2013yan de jî, 3378 mezûnê dibistana navîn, 1348 mezûnê lîsansapêşîn û 614 mezûnê

lîsansê jî bûne karmendê dewletê. Her wiha di sala 2012an de 988, di sala 2013yan de jî 591 astengdar bi pişkê ve li qadroyên karmendiyê hatine bicihkirin. Bi vî awayî di dawiya sala 2002yan di çarçoveya qontenjanê de hejmara karmendên astengdar 5.777 bû, ev hêjmar ji Adar a 2013an pêve gihîştiye 27.443 an. Di du salên dawiyê de jî zêdetirî 11.000 astengdar, weke karmend hatine îstixdamkirin. Ev hejmar nîşan dide ku bicihkirina ku di nav du salan de hatiye kirin, ji sedî 40 ê bi tevahiya îstixdama karmendan pêk tîne.

Mehaniyên ku ji astengdarên nikarin bixebitin an jî nikarin kar bibînin re hatine girêdan heta mîqtarên ji sedî 300 hatiye zêdekirin û gihîştiye girtinek baş û çerçoveya kesên mehane hat girêdan berhatiye firehkirin.

Karmendên astengdar
ji nobeta şev û
b e r d ê l (v a r d i y a) ê
hatine muafkirin,
dema mesaî û
b ê h n v e d a n a
astengdaran bi
awayekî cuda hatiye eşkerekirin. Ji bo astengdarên ku ji xwe re dixebitin re jî li gorî daxwazê mafê teqawidiya zû hatiye dayîn, ji dayikên xwedi zarokên astengdar û mûxtacî lênerînê bin re jî mafê teqawîdiya zû hatiye dayîn.

Ji bilî vê ji kesên hewcedar yên wek pîr û kalên 65 saliya xwe tejîkirîne, astengdarên ji 18 salî mezintir, ji kesên ku xizmên wan yên astengdar yên ji 18 salî biçûktir heye û li gor qanûnê divê li wan binêrin(bi şerta ku divê bi awayek fîîlî li xizmê xwe binêre) û kesên li gorî mewzûata ewlekariya civakî naxebitin derfeta girêdana mehanî hatiye anîn.

Di vê çarçoveyê de, heta dawiya sala 2012an ji 1.228.355 kesan re

mehanî hatiye girêdan û din av heman salê de pereye ku hatiye dayîn gihîştiye 2.911.191.180 TL yê.
dawiya sala 2002yan di çarçoveya
qontenjanê de hejmara
karmendên astengdar 5.777 bû,
ev hêjmar ji Adar a 2013an pêve
gihîştiye 27.443 an.
2002-2012
141
Cara yekem hemû astengdarên ku hewceyê lênerînê ne hat hildan nav çerçoveya xizmeta lênerînê û dayîna pereyên xizmetê a lênerîna li malê anjî li navendên lênerînên taybet jî hat pêk xistin. Ji navendên perwerdehiya taybet û rehabilitasyonê bêpere sûd wergirtina hemû welatîyên astengdar ên ku hewcetiya wan li perwerdehiya taybet heye hat temin kirin. Di sala 2006î de 83.000 astengdar ji vê xizmetê sûd wergirtin, lê di dawiya sala 2012an de ev hejmar derket 256.000 ê. Ji bo van xizmetan çavkaniya k udi 2006î de hat xerçkirin 263 milyon TL bû. Di sala 2012an de ev mîqtar derket 1 milyar 263 milyon TL yê. Hejmara astengdarên ku ji xizmeta lênerîna li malê sûd wergirtin heta dawiya sala 2012an 398.335 bû û ev hêjmar di meha Sibat a 2013yan de gihîştiye 408.165 an. Heta dawiya sala 2012an ji bo vê xizmetê 2 mîlyar û 944 mîlyon TL père hatiye dayîn. Di nav sala 2012an de li 97 navendên şûnewarê yên fermî ku ji astengdaran re xizmeta lênerîn û rehabîlîtasyonê
daye 5112, li 7
navendên bi roj jî
ji 460 astengdaran
re xizmet hatiye

dayîn. Heta dawiya
sala 2012an ji 148
navendên taybet yên ku xizmeta lênerîn û rehabîlîtasyonê dide astengdaran re, perê lênêrîna 9.328 astengdar ji aliyê dewletê ve hatiye dayîn, ji bo vê xizmetê 137 mîlyon TL père hatiye veqetandin.
Di sala 2002yan de ji 30 astengdaran re personelek a lênêrînê diket, vê pêngavê ji şeş astengdaran re personelek a lênêrînê dikeve.
Di sala 2002yan de dibistanên ji bo xwendekarên me yen astengdar 308 bûn, ev hêjmar di dawiya sala 2012an gihîşt 814 an. Mamosteyên ku di van dibistanan de dersê didin ji 2.834 an, bilindî 7.607 bû. Li dibistanên perwerde yên taybet yên ji bo astengdaran vebûne, hêjmara xwendekarên ku di polên perwerdehiya taybet û di perwerdehiya hevnaskirinê de perwerde dibînin ji 53 hezaran gihîştiye 220 hezarê (ev dibistan girêdayê Wezareta Perwerdehiyê ne). Ji bo gihandina
Di sala 2002yan de ji 30
astengdaran re personelek a
lênêrînê diket, vê pêngavê ji şeş
astengdaran re personelek a
lênêrînê dikeve.
Şoreşa Bêdeng
142
zarokên astengdar ên perwerde dibînin serwîsên bê mûçe hatin terxankirin-tehsiskirin. Di çarçoveya Projeya Perwerdehiya Bi Servîsî de hêjmara xwendekarên astengdar yên di heyama perwerdehihindekarî ya 2012-2013an de hatin kişandin bûye 46.095.
Ji bo ku kesên astengdar di nav jiyana civakê de astengî nekşînin ; her cûre rê, peyarê, derbasoka peyayan, qadên vekirî û heşîn, qadên sporê û wekî qadên civakî û binesaziya çandiniyê û avahiyê û xizmeta

kişandina komî yên nav bajêr yên ku şaredarî didin anjî kontrol dikin li gorî astengdaran bi pêwîstî hatine sererast kirin. Di xaniyan de ji astengdaran re serastkirinên fizîkî hatine kirin da ku jiyana wan hêsan bibe. Ji bo sepandinên cudaxwaz ku li dijî astengdaran bê kirin kirdariyên cezaî hat anîn.

Ji bo welatîyên me yên astengdar, derbarê sepandinên alikariya civakî û pişteva niyê de di dawiya sala 2012an de mîqtara çavkaniya ku hatiye bikaranîn gihîştiye 7, 27 mîlyar TL yê û çavkaniya gelemperîyê yên di vê çarçoveyê de hat bikaranîn di nav GSYH ê de rêjeya wê bilindî %0, 51 ê hat kirin.

Ji Bo Komên Xwedî Dezavantaj Sepandina Firehkirina Cudakariya Pozîtîf

Ji bo ku rêgeza wekheviyê di sepandinê de bigihîje wateyê, ji bo komên xwedi dezavantaj sepandinên taybet têket merîyetê û ji bo piştgirîdayîna mafê wan cudatiya pozitif hat rojevê. Ev sepandina cudatiya pozîtîf, di asta makezagonî de cara ewil di sala 2004an de hatiye anîn. Di hukmê de:“Jin û mêr xwedî mafên wekhevin. Dewlet stûbare ku vê wekheviyê derbasî jiyanê bike” ye tê gotin .

Di sala 2010an de bi hukma “tevdîrên ku bi vê armancê dê bên girtin wekî li dijî rêgeza wekheviyê nikare bê şîrovekirin” ku li vê xalê hat zêdekirin ve cudatiya ji bo jinan hêj zelaltir hat îfadekirin. Bi guhertina makezagonî a 2010an ji bo hêlên cuda jî serastkirinên mîna yên din hat pêşdîtin: “Tevdîrên ku ji bo zarok, pîr û kal, astengdar

sêwî û jinebiyên şehîdan û ji bo malûl û xaziyan dê bên girtin dê li dijî rêgeza wekheviyê neyên dîtin.”

Bi vî awayî di asta mekezagonî de ji bilî jinan ji bo zarok, pîr û kal,

astengdar, sêwî û jinebiyên şehîdên şer û erkê û astengdar û xaziyan jî êdî dê cudatiya pozîtîf bê kirin. Di vê wateyê de ji bo serastkirinên ku li hember rêgeza wekhewiyê mexdûriyetên kesên xwedî dezavantaj çareser bike bê danîn bingehek makezagonî pêngavek erêniye. Lê belê ya girîng ewe ku, dewlet ji bo van aliyan di çerçoveya rêgeza dewleta civakî de polîtîka û tevdîrên bandordar bisepîne.

Li Rohilatê û Başurê Rohilatê Anatolyayê Zêdekirina Razemeniyên Gelemperîyê

Di razemeniyên dewletê yên ji bo Herêmên Rojhilat û Başûrê Rojhilatê de di heyama 2002-2012an de zêdebûnek gelek mezin hatiye bidestxistin. Di pêvajoya deh salî de razemeniyên ku ji van herêman re hatine kirin bi giştî, li ser 37 milyar TL yê ye.

Li gorî daneyên Wezareta Peşveketinê; para ku Herêma Rojhilat û Başûrê Rojhilatê ji bernameyên razemeniyê standine di sala 2002yan de ji sedî 7 bû, ev hejmar di sala 2012an de gihîştiye ji sedî 12 an. Pereyên ku ji HerêmaRojhilat û Başûrê Rojhilatê Anatolyayê re hate veqetandin di sala 2002yan de bi tevahî 2.198.065, 00 TL bû, di sala 2012an de ev hejmar razemeniyên KÖYDESê jî têde, bitevahî gihîştiye 6, 5 mîlyar TL yê.

Bi Projeya Başurê Rohilatê Anatolyayê (GAP) Pêşveçûna û Zêdekirina Refaha Li Heremê

Projeya Başurê Rojhilatê Anatolyayê (GAP) armanc dike ku asta hatiniya gelê herêma Başûrê Rohilatê û standarda jiyana herêmê bilind bike. Bi vê projeyê tê armanckirin ku di nav vê herêm û herêmên din de cudatiya pêşveçûnê ji holê rabe. Ji bo herêm pêşbikeve, bi gelek sektoran ve dest bi vê projeyê hatiye kirin. Di çarçoveya GAPê de, neh bajarên (Adıyaman, Batman, Dîyarbakır, Gaziantep, Kilis, Şoreşa Bêdeng

Mardin, Siirt, Şanlıurfa û Şırnak)ku ji aliyê erazî û mezinahiya nifûsê ve kêmzêde ji sedî 10ê Tirkiyeyê pêk tîne, heye.
Di çarçoveya GAPê de ku ji 1989î pêve di sepandinê de ye heta dawiya sala 2012an nêzî 48 mîlyar TL xercene hatiye kirin. Di vê pêvajoyê da di mijara santralên hîdroelektrîkê yên ku yek ji planên herî girîng yê GAPê ye de encamên gelek serkeftî hatine bidestxistin û heta niha deh lib santralên hîdroelektîrîkê hatine çêkirin û dest bi şixûlandinê hatine kirin. Li gorî daneyên sala 2012 î nîvê vejena hidrolik a ku li giştiyê welêt tê hilberandin, ji ev santralên GAPê de tê girtin.
Di çarçoveya GAPê ku welatê me di qada navneteweyî de dide nasîn û marqa û girîngiya wê zêde dike de di serî de avdani, ji bo ku pêdiviyên binesaziya bingeh pêk bê û li herêmê pêşketina aborî û civakê bilez û bez were kirin, di sala 2008an de “Plana Tevgerê a GAPê” têket sepandinê. Di Plana Eylem a GAPê de, wekî ‘pêkhatina pêşketina aboriyê’, ‘bidestxistina pêşketina civaki’, ‘pêşvebirina binesazî’ di bin çar sernavên sereke de bi tevahî heftêh û sê plan cih digire. Armanca van planan di serî de, zêdekirina istihdamê zêdekirina qelîteya xebatkaran pêkxistina entegrasyona civakî û bi taybetî istihdamkirina jin û ciwanan ne. Di vê çerçoveyê de di warên wekê ragihandin avahî perwerdehî tenduristî çand tûrîzm û pişesaziya organize de razemenî dest pê kiriye.
Di heyama 2008- 2012an de di çarçoveya Plana Tevger a GAPê de, ji bo zêdetir 300 proje û xebatan ji saziyên ku derbarê vê de têkildarin re zêdetirî 18 mîlyar TL père hatiye dayîn û 15 mîlyar TL yê wê hatiye xerçkirin. Bi vî awayi para razemeniyên li herêmên GAPê, di nav budçeya navendî de bûye du qat û ji sedî 7an derketiye ji sedî 14an. ligel vê zêdebûna razemeniyê di sala 2009an de rêjeya bêkariya

li herêma GAPê ku ji sedî 17, 4 bû, di sala 2011an de daketiye 11, 7an. Di sala 2002yan de derfirotina ku ji herêma GAPê hat kirin, 600 milyon dolar bû, lê ev reqem nêzî çardeh qat zêde bûye û di sala 2012an de gihîştiye 8, 1 mîlyar dolaran. Derfirotina Tirkiyeyê di 2002-2012

145

heyama 2007-2012an de bi tevahî bi rêjeya % 42, 2 zêde bûye, di derfirotina herêma GAPê jî di heman heyamê de nêzî qat û nîv zêdebûn hatiye pêkxistin.

Di deh salên dawî de, rêjeya bi dibistanîbûnê ya li herêma GAPê di perwerdehiya beriya dibistanê de ji sedî 3yan bilindî ji sedî 55an, di dibistana ewil de ji sedî 8an bilindî ji sedî 99an, di dibistana navend de ji sedî 27an bilindî ji sedî 50yî bûye. Ji aliyê din li herêmê hêjmara zanîngehên ku 3 bûn, bi avakirina 6 zanîngehan ve derketiye 9an.

Projeya Vegera Gundan û Rehabîlîtasyonê

Projeya Vegera Gundan û Rehabîlîtasyonê ji bo welatîyên me yên ku li heremên Rojhilat û Başûrê Rohilatê dijiyan, lê ji ber teror û qisawetên ewlekariyê cih û warên xwe terk kirin, lê êdî bidil dixwazin vêgerin gundên xwe, ji bo ku vegera wan were hêsankirin, li gundên ku lê hate vegerîn pêdiviyên wan ên civakî û tesîsên binesaziya aborî pêk bên, şert û mercên jiyanê jinûve çêbin, kesên naxwazin vegerin jî jiyana wan ya li bajarên din dijîn bê başkirin hatiye destpêkirin.

Ev proje li 14 bajarên me (Adıyaman, Ağrı, Batman, Bingöl, Bitlis, Dîyarbakır, Elazığ, Hakkari, Mardin, Muş, Siirt, Şırnak, Tunceli, Van) tê sepandin. Ev proje ji bo ku gundên jinûve lê veger çêbû, jiyan jinûve bê destpêkirin û jiyana li gund bikeve rewşek mayînî xebatên derbarê avakirina binesaziya gundan dihewîne. Ji bilî van geşkirina xebatên derbarê feelîyetên çandinî, sewalkarî û hunerên destan, ji bo

welatîyên ku naxwazin vegerin gundan û dixwazin li bajaran bijîn jî xebatên wekî qûrsên kar û karbendiyê, projeyên geşkirina îstîxdamê û bi taybetî projeyên ku jin, ciwan û zarokan armanc digire yên civakî dihewîne.

Bi saya vê projeyê welatîyên me yên ku di salên 1990an de bi hinceta teror û ewlekariyê koçber bûne, bi tevahî ji 62.448 mal ji 386.360 welatîyên me, 28.384 mal jinûve hatin sazkirin, yanê 187.861 welatî vêgerîyan gundên ku berê têde dijîn. Di çarçoveya projeyê de heta dawîya sala 2012an 146.015.000, 00 TL çavkanî hatiye bikaranîn.

Şoreşa Bêdeng

146

Di çarçoveya projeyê de ji bo ku navêndên civak, ciwan, werzîş, jin û zarokan bên damezrandin projeyên bi naveroka rehabîlîtasyon û civakê, ji bo navendên perwerdehiyê bên avakirin jî projeyên xwedî karbendîkirinê û îstixdamê wargehên xwendekaran, rê, av, ceryan, binesazî û yên din hatin kirin. Ligel van projeyên binesaziyê projeyên temirkirina dibistan û ocaxên tenduristiyê yên xerabe hatine çêkirin. Ji bo ku tesîsên din jî bên bikaranîn hatine nûkirin. Welatiyên ku vegerîn gundê xwe ji bo ku bikaribin mala xwe çêkin derbarê vê yekê de proje hatine geşkirin. Projeyên nû yên derbarê çandinî û sewalkariyê de jî pêk hatine.

Ji Bo Mexdûrên Terorê Dayîna Tezmînatên Zirarê

Bi armanca zirarên welatîyên me yên ku di çarçoveya feeliyetên teror û têkoşîna bi terorê re de dîtine, bêyî çûyîna saziyên darazê yên neteweyî û navneteweyî, bi awayekî lezgîn bandordar û dadmend bêne tanzim kirin, di sala 2004an de “Qanûna Derheqê Dayîna Zirarên ku Ji Teror û Ji Têkoşîna Terorê Çêbûye” ket merîyetê. Di çarçoveya qanûna ku ket merîyetê de; mirin, birîndarbûn û zirarên

ku ji ber seqetiyê derketine, zirarên di mal û milk de derketine, zirarên derbarê çandinî û sewalkariyê de pêk hatine û welatîyên me yên ku bi sedema terorê koç kirine lê nikarin bigihîjin mal û milkê xwe zirarên wan têne dayîn.

Berê serîlêdanên ku derbarê îdîayên valakirina gundan de li AİHMê dihatin kirin, bêyî ku li şerta 'rêyên nav hiqûqa navxweyî xilas bibe' dihat nêrîn û Dadgeha Mafên Mirovan ya Ewropayê (AİHM) ev serîlêdan qebûl dikir. Lê piştre bi derketina qanûna tanzîmkirina zirarên mexdûrên terorê re, Dadgeha Mafên Mirovan ya Ewropayê dîyar kir ku ev serastkirin di nav hiqûqa navxweyî de rêyeke bi bandor e û êdî serîlêdanan nepêkan dîtine û berê van serîlêdanan jî daye Komîsyonên Tesbîtkirina Zirarê.

Bi armanca tanzîmkirina zirarên di çerçoveya qanûnê de li bajaran "Komîsyonên Tesbîtkirina Zirarê" hatin damezrandin. Ji van

2002-2012

147

komîsyonan 66ê ji wan xebata xwe temam kirine, komîsyonên li bajarên din jî xebatên xwe didomînin.

Di çarçoveya vê qanûnê de, heta Avrêla sala 2013an, bi "Komîsyonên Tesbîtkirina Zirarê" re, bi tevahî 361.322 serîlêdan hatine kirin. Ji van serîlêdanan 320.196 ji wan hatine encamkirin; ji van serîlêdanan ji bo 172.129an biryar hatiye dayîn ku tazmînat bê dayîn. Di Avrêla 2013an de serîlêdanên ku ji aliyê komîsyonan ve erênî hatin encamkirin û welatîyên ku sûlhname îmze kirin bi gişti 2.967.760.380 TL pere standin, ev pere bi temamî ji kesên ku zirar dîtine re hatiye dayîn.

PÊNGAVÊN KU DI WARÊN
HÊZDARKIRINA RÊVEBIRINÊN HERÊMÎ
DE HATIN AVÊTIN

2002-2012
151
PÊNGAVÊN KU DI WARÊN HÊZDARKIRINA
RÊVEBIRINÊN HERÊMÎ DE HATINE AVÊTIN
Di warê dayîna xizmetên gelemperîyê de rêvebirina gelemperîyê ya Tirkiyeyê gelek salên dirêj bi şiklekî navendî birêve çû. Ji ber vê rewşê dewsa pêvajoya biryargirtina bicihanîna gelek peywiran ku divê ji aliyê şaredarî û rêvebirîyên taybet yên bajêr ku rêvebirîyên herêmî ne werin girtin ku di destê navendê de mane û vê rewşê encam daye ku xizmetên bi rêvebirîyên herêmî ve têkildarin ji aliyê saziyên hikumeta navendî ve werin kirin.
Ji ber ku xizmetên gelemperîyê ku bi wesfa herêmî ne ji aliyê saziyên hikumeta navendî hatiye dayîn, rêya zûtir û bi bandor, sûdewar, bi qelîte û bilezdayîna van xizmetan asteng kiriye; gelek caran xizmetên ku hatine dayîn dûrî daxwazên herêmî mane. Li cem vê venêrîna wesayeta tund ya navendê ya li ser şaredarî û rêvebirîyên taybet yên bajêr yên ku rayeya wan gelekî bi sînor in û dema ku ev rêvebirtî peywirên xwe bi cih tînin rastî bêderfetiyên mîna aboriyê tên ku ji ber van sedem û pirsgirêkan reforma berfireh ya rêvebirîyên herêmî mecburî dibe.
Di çarçoveya ku hate dîyarkirin de; bi armanca hêzdarkirina demokrasîya herêmî, di navbera rêvebirîyên herêmî û navendî de jinûve parvekirina peywiran, rêvebirîyên herêmî di warê îdarî û aboriyê de jinûve wek xweserî pêşandin û li cihê herî nêzîk dayîna xizmetên herêmî (prensîba di xizmetê de devertî) reforma rêvebirîyên herêmî ya ku gelek sal in di rojeva welat de ye, dest bi sepandinê
Şoreşa Bêdeng
152

hatiye kirin. Di pêvajoya guherîn û veguherîna demokratikbûna deh salan de, piştî pêngavên derbarê şûbeyên îdarê yên taxî yên di warê demokrasîya herêmî de cihekî girîng digirin hatin avêtin, rêvebirîyên herêmî di warê aborî û îdarî de hêj hatin hêzdarkirin; ji şaredarî û rêvebirîyên herêmî yên bajêr re, di çarçoveya prensîba "li cih rêvebirin"ê de derfeta hêj bi bandor û sûdewar peywirdarkirin hatiye dayîn.

Di vê çarçoveyê de; derbarê şûbeyên rêvebirîyên taxî qanûnên nû hatine derxistin û bi vî şiklî mewzuata rêvebirinên herêmî yên nûjen hatiye çêkirin. Ji bo ku demokrasî di asta herêmî de hêzdar bibe û xizmetên gelemperîyê hêj bi bandor û sûdewar werin dayîn sînorên şaredariyên mezin jinûve hatine serastkirin.

Di beşa envanter ya pirtûkê de, ji nav van pêngavan yên serekî yên ku bi awayekî kronolojîk û hurgilî hatine rêzkirin li jêr hatiyê vegotin:

Mewzuata Rêveberinên Herêmî Ya Nûjen û Nû

Ji dîyariyên herî girîng ya ku asta pêşketina demokrasîya welatekî nîşan dide, peywir, raye û qadên firehbûna berpirsyarî û hebûna derfetên têr yan jî netêr yên rêvebirinên herêmî ne. Li Tirkiye gelek salan ji ber bingeha pir tund ya navendî hêza rêvebirîyên herêmî hatiye sînorkirin û di mewzuatê de serastkirinên hewcehî pêk nehatiye. Beriya Qanûna Şaredariyê ya nû ya sala 2005an Qanûna Şaredariyê ya sala 1930î di merîyetê de maye ku ev jî mînaka herî eşkere ya vê rewşê ye. Di vê wateyê de, nêrîneke li paş serdem maye, bi navendîbûneke têr û bi dayîna rayeya rêvebirîyên herêmî li qadên tevgeriya wan girtiye demeke dirêj desthilat bûye.

Wek hewcehiya devertîbûn û demokratîkbûnê, şaredarî û rêvebirinên taybet yên bajêr, li gor prensîba "di xizmetê de devertî" ya ku di Makezagona me de cih digire û di çarçoveya "Şerta Xweserîtîya

Rêvebirinên Herêmî ya Ewropayê” de jinûve hatine bi dest girtin û di vî warî de hemû qanûnên sereke di deh salên dawî de hatine guhertin.
2002-2012
153
Qanûnên ku hatine derxistin nûbûnên girîng anîne; li gor hewcehiya demê yekeyên rêvebirinên taxî jinûve hatine bi dest girtin. Di vî warî de li gor mînwala demokrasîya herêmî wesfa bingehîn ya ku derdikeve pêş, kêmkirina wesayeta rêvebirina navendî ya li ser rêvebirîyên taxî û li gor hewcehiya demokrasîya herêmî sazîbûyîn e. Di vê çarçoveyê de nûtiyên girîng yên ku hatin pêk anîn ev in:
1. Qanûna Şaredariyê Ya Bi Hejmara 5393: Berpirsyarî, raye, peywir, dezgeh û binesaziya teşkîlatê yê şaredariyan jinûve hatiyê pênasîn û rêvebirinên şaredariyan li gor çarçoveya prensîba «di xizmetê de devertî» wek bi şiklekî xizmet dayînê gihîştiye xweserêtiya îdarî û aborî. Ji aliyê din wesayeta li ser biryarên meclîsa şaredariyan hatiye sînorkirin, hemû hewcehiyên bi wesfa şîrîktayî û devertî yên ku li sînorê şaredariyan wek peywirên şaredariyan jinûve hatine serastkirin, ji bo di dayîna xizmetên şaredariyê de beşdarbûn were kirin «Konseyên Bajêr» gihîştine statuya hiqûqî, ji şaredariyan re derfet hatiye dayîn ku personelên bi peyman bixebitînin û digel dezgehên Sivîl û saziyên navneteweyî projeyên xizmetî yên şîrîktayê bikin.
2. Qanûna Şaredariya Mezin Ya Bi Hejmara 5216: Bi vê qanûnê ve; sînorên Şaredariyên Mezin wek girêdayê nifûsa wan hatiye firehkirin û tevlîheviya raye û peywirê ya ku di navbera Şaredariyên Mezin û

şaredariyên navçeyên bajarên mezin de dihat jiyîn bi dawî bû. Di çarçoveya ku rê da razemeniyên li sînorên Şaredariyên Bajarên mezin werin kirin ji bo navendekê bên kordînekirin ku ji aliyê din derfet da ku Şaredariyên Bajarên mezin li ser sepandinên îmar û planên îmarê yên bajarên li navçeyan venêrînê bike. Bi saya vê venêrînê li bajarên mezin li ber bajarbûna bêpergal û çewt, binyatbûna qaçax û şevnişînbûnê hate girtin.
Şoreşa Bêdeng
154
3. Qanûna Rêvebirinên Taybet ya Bajêr Ya Bi Hejmara 5302: Bi vê qanûnê ve, berpirsyarî, raye, peywir, dezgeh û binyadên teşkîlatê yên Rêvebirinên Taybet yên Bajêr jinûve hatinê pênasîn û Rêvebirinên Taybet yên Bajêr li gor çarçoveya prensîba «di xizmetê de devertî» wek bi şiklekî xizmetdayînê gihîştiye xweserîtiya îdarî û aborî. Meclîsa Giştî ya Bajêr, wek dezgeha biryara Rêvebirinên Taybet ya Bajêr hatiye sepandin; hikum hatiye girtin ku serokê/a meclîsa giştî ya bajêr ji nav endamên meclîsê were hilbijartin; li ser biryarên meclîsa gel ya bajêr rayeya wesateyê hatiye sînorkirin, teşkîlata îdareya taybet ya bajêr wek sekreteriya giştî hatiye serastkirin; hatiye plankirin ku li cem peywirên derbarê binesaziya çolter ya li der sînorên şaredariyê plana pergala dorhêla bajêr, avadanî û îskan, parastina axê, libergirtina erezyonê, çand, huner, turîzm, xizmetên civakî û alîkarî û gelek peywirên bi wesfa şirîkatîya taxî ya derbarê perwerdehiyê de ji aliyê îdareyên taybet yên bajêr ve

werin bi cih anîn.
Ji bo pêkanînê jî derfet hatiye dayîn ku di îdareyên taybet yên bajêr de personelên bi peyman werin îstihdam kirin. Bi vî şiklî jî prensîba ku xizmet li cihên herî nêzîk û li gor rêbazên herî rast were dayîn hatiye pejirandin, bi anîna van hukman ve jî hatiye armanckirin ku di Rêvebirinên Taybet yên Bajêr de nêrîneke demokratîktir û welatî navendgirt desthilat bibe.
4. Qanûna Yekîtiya Îdareyên Taxî Ya Bi Hejmara 5355:
Bi vê qanûnê ve, Yekîtiya Rêvebirinên Taxî yên ku ji aliyê Rêvebirinên Taxî ji bo ku hin xizmetê hevpar werin bicihanîn hatibûn avakirin, cara ewil gihîştine statuya hiqûqî û berpirsyarî, raye, peywir, dezgeh, binyadên avakirinê, statuyên hiqûqî yên Rêvebirinên Taxî yên ku
2002-2012
155
dê nû werin avakirin girêdayî hukmê bûne. Yekîtiya Ji Gundan Re Birina Xizmetan jî gihîştiye statuya hiqûqî û fermî û bi vî awayî jî ji bo sepandina projeyên KÖYDESê yên ku ji welatîyên ku li qadên çolter dijîn re derfetên di serî de ava vexwarin, hatin çûyîn û gihîştina xizmetên binesaziyên sereke peyda bike binesaziya dezgehî hatiye amadekirin. Bi van kirinan ve jî hatiye armanckirin ku di navbera Rêvebirinên Taxî de hevkarî zedetir bibe, dayîna xizmetên hevpar hesantir bibe, xizmetên devertî yên hevpar hilbertir bibe, xizmet bandortir û bi qalîtetir werin dayîn
5. Qanûna Derbarê Ji Şaredarî û Rêvebirinên Taybet

Yên Bajêr Re Ji Hatiniyên Bacên Budçeya Gişтî Par
Dayîn: Bi vê qanûnê ve him çavkaniya komî ya ku ji budçeya navendî ji rêvebirîyên herêmî re tê veguhastin zedetir bûye him jî pergala ji rêvebirîyên herêmî re pervekirina vê çavkaniyê hatiye guhertin. Veguhastina vê çavkaniyê di sala 2002yan de 4, 7 milyar TL pek hatibû, piştî vê guherînê ev veguhastin di sala 2012an de gihîşte 27 milyar 713 milyon TL yî.
Bi Armanca Ku Demokrasî Di Asta Devertî De Hêzdar Bibe Jinûve Serastkirina Sînorên Bajarên Mezin
Bi serastkirin a ku di sala 2012an de kete merîyetê ji bo ku xizmetên gelemperîyê hêj bi bandor û sûdewar werin pêkanîn sînorên bajarên mezin jinûve hatine serastkirin. Bi vê qanûnê re, hatiye armanckirin ku li Tirkiyeyê demokrasî di asta devertî de hêj bi bandor bibe, di xizmetên şaredariyê de sûdewar pêk were û hêj baş were dayîn.
Di vê çarçoveyê de hejmara Şaredariya Bajarên mezin ji 16an derketiye 29an Berpirsyarî û qadên peywirê yên Şaredariyên Bajarên mezin bi şiklê girtina sînorên milkî yên bajêr ve hatiye berfirehkirin.
Ji aliyê din bi vê qanûnê ve hatiniyên çavkaniyên Şaredariyên Bajarên

mezin hatine zêdekirin. Di Bajarên mezin de hukmê şexsîtî hatiye rakirin, gund û bajarok wek tax hatine veguherandin.
Bi anîna vê serastkirinê re peywirên Rêvebirinên Taybet yên Bajêr yên derbarê xizmetên herêmî, dewrî şaredariyan dibe. Bi vê guherînê re jî binyatkirina rêvebirîyên herêmî hêj bandordar dibe û tê armanckirin ku demokrasîya devertî jî hêj bi bandor bibe.
ENCAM

2002-2012
159
ENCAM
Ev xebat, ne hemû pêngavên ku deh salên dawî de hatine avêtin, pêngavên ku di warên mafên mirovan û demokratîkbûnê de hatin avêtin û unsûrên sereke yên ku ev pêngav mimkûn xistin dihewîne. Ev pêvajoya ku bi pêngava rakirina rewşa Awarte ya ku di sala 2012an de dest pê kir ve, veguherîya ye şoreşeke bêdeng ya ku jiyan normalîze kiriye, hişt
ku Tirkiye bi hemû
saziyên xwe û ligel
hemwelatîyên xwe ve
pir alî aram bibe.
Di deh salên dawî de,
ji bo çareserkirina
pisgirêkên ku ji
paşerojê heya
niha didomin
nêrîneke nû hatiye
pejirandin. Ev nêrîn,
dijî paradîgmaya
ewlehiyê ya ku bi
salane pêk tê û
bergeheke wisa ye
ku di çareserkirina
pirsgirêkên welat de nirxên demokratîk yên gerdnî pêş dixin berçav digire. Tirkiye, di deh salên dawî yên ku li paş hiştin de di warê
Di deh salên dawî de, ji bo

çareserkirina pisgirêkên ku ji
paşerojê heya niha didomin
nêrîneke nû hatiye pejirandin. Ev
nêrîn, dijî paradîgmaya ewlehiyê
ya ku bi salane pêk tê û bergeheke
wisa ye ku di çareserkirina
pirsgirêkên welat de nirxên
demokratîk yên gerdnî pêş dixin
berçav digire. Tirkiye, di deh salên
dawî yên ku li paş hiştin de di warê
demokratîkbûnê de mirov dikare
bêje ku meqesa xwe quherandiye
û polîtîkayên xelet yên berê
terikandiye ûreformên
mezin pêk aniyê.
Şoreşa Bêdeng
160
demokratîkbûnê de mirov dikare bêje ku meqesa xwe quherandiye û polîtîkayên xelet yên berê terikandiye ûreformên mezin pêk aniyê. Bi “Projeya Biratî û Yekîtiya Neteweyî” ya ku di sala 2009an de dest pê kir ve guherîna paradigmaya ku me behs dikir hemû pirsgirêkên agirnak yên ku li hember Tirkiyê disekinîn pêgeh kir. Qadeke ku axaftina her tiştî mimkun kir û devjêberdana hemû polîtîkayên înkarê pêk anî derxist holê. Bi projeya “Projeya Biratî û Yekîtiya Neteweyî” re gelek mijarên ku nedihatin dîtin û serîlehatibûn girtin hatin rojevê û bi vî awayî jî ji bo normalîzebûna welat têvkariyek hate dayîn. Bi vî awayî mirov dikare bêje ku tu mijar û tabû nema ku nehat axaftin û nîkaş kirin.

Hemû pêngavên ku hatin avêtin ji bo çareserkirina pirsgirêkên kronîk yên Tirkiyê tevkariyeke girîng pêk anîn. Digel rakirina rewşa awarte ji bo ku jiyana rojane ya hemwelatîyên ku li qadeke fireh a Tirkiyeyê dijîn hêsan bibe; bi paşerojê ve bi awayekî wergirî rûbarî pêk were; li hember îradeya gel hemû cûre wesayet rabin; mafên çandî fireh bibin; di serî de bikaranîna zimanê Kurdî di gelek waran de nêrîneke azadixwaz serdest bibe di vê çarçoveyê de gelek pêngav hatin avêtin. Bêgûman ev pêvajo, piştî encama rêwîtiyeke dûr û bi zehmet derket holê. Di beşa dema ku hat dîyarkirin de di mewzûatê de jenîneke pêgehî hat kirin û hukmên li dijî azadîxwaziyê û antî demokratîk yên ku di demên cuda de di nav pergala hiqûqê de cih girtine, hatin derxistin û paqij kirin. Gelek serastkirinên ku bandorên wan di jiyanê de bi rengekî nerasterast dihatin hîskirin ji nav pergala hiqûqê hatin derxistin. Heke her tim di hişê me de nêrîna ku demokratîkbûn pêvajoyeke tu carî bi dawî nabe cih bigire, divê pêngavên din jî li ser xebatên ku me behs kirin werin avêtin û domandina van xebatan jî bi awayekî nelezbirî wek hewcetiyeke girîng were dîtin.

Wextê ku digel dayînên têvkariyên pêşketinên qadên aborî ve werin ramankirin; reformên ku di warê dewleta hiqûqê, mafên mirovan û demokrasîyê de pêk hatin jixwebaweriya Tirkiyeyê jî zêde kir. Rewşa

bêhêviyê ya ku bêîstîqrarîya beriya sala 2002yan, destwerdanên antî demokratîk û neyîniyên wek wisa derketibû holê, bi pêkanînên deh salên dawî ve ji holê hatin rakirin û bi vî şiklî jî mirov jî bi nêrîneke hêvîdar li pêşerojê nêrîn. Pêngavên ku ji bo demokratîkbûnê hatin avêtin, ji ber ku li gor berjewendîyên civakê pêk hatin û bersiva hacetên rasteqîn dan, ji civakê jî pistgiriyeke gelek mezin dîtin.

Sedema bingehîn ya pêşketinên aborî û qada îstîqrara ku di deh salên dawî de derket holê ya Tirkiyê ev e.
Wek dawî; di rêwîtîya azadî û demokrasîya Tirkiyeyê de, di pêvajoya di navbera salên 2002-2012an de zîvranokên dijwar hatin derbaskirin û pêngavên xurt hatin avêtin. Digel vê, li dinya û Tirkiyeya ku diguhere tiştên ku divê werin kirin bêguman bi van kirinan ve nayên sînorkirin. Ji bo ku daxwazên zêdetir aramî, demokrasî, ewlehî ûazadîyê yên welatîyan pêk werin û bîrokrasiya gelemperîyê li paş pêşketinên dinyayê nemîne, divê reform bi biryarî werin domandin. Di bingeha nêrîna Tirkiyeyê de dad û aşîtiya civakê heye, cudabûn û kûrahiya erdnîgarî, çandî û dîrokîya xwe jî wek dewlemendî dibîne. Tirkiye bi vê nêrîna xwe jî dê bibe welatekî hê aramtir û bi refahtir, di asta xwe ya ku hemwelatîyên wê di nav reşweke hêj şad, azad û ewlehîyê de dijîn hêzdartir bike. Tirkiyeke wisa, bi rejîma xwe ya demokratîk, polîtîkaya xwe ya derve ya aştîxwaz, aboriya xwe ya bi îstîqrar û hêzdar ve aktoreke wekî lîstîkçêker, dê hêj zêde têvkariyê bide îstîqrara heremê û gerdûnê.
2002-2012
163
BEŞA DUYEMÎN
ENVANTERA GUHERÎN Û
VEGUHERÎNA TIRKIYE YÊ
(2002-2012)
2002-2012
165
Di heyama nêz de hewlên qada demokratîkbûnê bi pêvajoya namzedbûna Yekîtiya Ewropayê ya Tirkiyeyê ku di sala 1999an de li Helsînkiyê lezgîntir bû û di wî warî de bi taybetî

di serî de guherînên Makezagonê yên ku li sala 2001ê pêk hat ve gelek pêngavên girîng hatin avêtin. Digel vê ev xebata ku bi sernavê “Envantera Veguherîn û Guherîna Tirkiyeyê” hatiye kirin, ji ber zêdebûna reformên pêk hatin, çarçoveya wan, wesf û bandorên wan yên xebatên ku di yazdeh salên dawî yên di navbera salên 2002-2012an de pêk hatine dihewîne. Ji aliyê din ve ji ber girîngiya wan pêngavên ku di yazdeh mehên ewil yên sala 2013an pêk hatin jî di nav vê xebatê de cih girtin.

2002

2002-2012

169

2002

YEKEMÎN PAKÊTA HEVSAZİYA YEKÎTIYA EWROPAYÊ6

· Guherînên Di Qanûna Cezayê Ya Tirk Ya Li Ser Hejmara 765 Hatin Kirin: Bi guherîna Qanûna Cezayê ya Tirk (TCK) ya fikraya yekemîn ya madeya 159. ve cezaya sûca tezyîfkirin û tehkîrkirina dewlet û dezgehên wê ji navbera 1-6 salî ketiyê navbera 1-3 salî. Bi guherîna madeya 312. ya TCKê ve jî cezayên pereyan ji teksa maddeyê hatine derxistin. (Madeyên 1. û 2. Qanûna bi hejmara 4744)

· Guherînên Di Qanûna Têkoşîna Li Dijî Terorê De Hatin Kirin: Bi guherînên madeyên 7. û 8. yên Qanûna bi hejmara 3713 hate kirin ve di van madeyan de sînorkirinên li ber azadiya îfade û ramanê hate sist kirin. (Madeyên 3. û 4. yên Qanûna bi hejmara 4744)

· Kurtkirina Maweya Binçavkirinê: Hukma ku rê dida maweya binçavkirina sûcên ku bi komî werin kirin heta 7 roja pêk were

ya ku di fikraya duyemîn ya madeya 16. de ya Derheqê Ûsilên Darizandin û Sazkirina Dadgehên Ewlehiya Dewletê de hebû ji teksa madê hate derxistin. Bi guherîna di fikraya 3. de hat kirin ve li heremên ku sepandina rewşa awarte birêve diçû maweya binçavkirinê ji «7 rojan» kete «4 rojan» ; heda herî zêde ya vê maweyê jî ji «10 rojan» kete «7 rojan». Di heman çarçoveyê de, 6 Qanûna bi dîroka 6/2/2002 ya bi hejmara 4744 (Rojnameya Fermî: 19/2/2002,
24676).
Şoreşa Bêdeng
170
hevoka duyemîn ya fikraya duyemîn ya madeya 128. ya CMUKê (Qanûna Dadrêsiya Ûsilê ya Cezayê) ji teksa madê hate derxistin û bi vî awayî herî zêde maweya binçavkirina sûcên ku bi komî hatine kirin ji «7 rojan» kete «4 rojan». (Madeyên 5. û 6. yên Qanûna bi hejmara 4744)

· Firehkirina Mafên Hevdîtinê Ya Gumanbar Bi Parêzerê Xwe Re: Bi Guherîna madeya 16/4 ya Qanûna Derheqê Ûsilên Darizandin û Sazkirina Dadgehên Ewlehiya Dewletê (DGM) ve, derfeta ku dema gumanbar di binçavkirinê de bi parêzerê xwe re hevdîtinê pêk bîne bi awayekî mijarên sûcên ku di bin rayeya darizandina di heman dadgehan de ne jî bigire hate firehkirin. (Madeya 5. ya Qanûna bi hejmara 4744)

· Ji Xizman Re Firehkirina Derfeta Ragîhandinê Ya Di Rewşa Kesên Girtî An Jî Binçavkirî De: Bi guherîna bi fikraya sêyem ya madeya 107. ya CMUKê hate kirin re ji xizmekî yan jî kesekî ku ji aliyê girtî ve hat dîyarkirin re derbarê girtinê yan jî fermana dirêjkirina maweya girtinê de bi biryara Dozgerê Komarê bê

derengmayîn agahdarkirin bi hukmê ve hate girêdan. (Madeya 7. ya Qanûna bi hejmara 4744)

DUYEMÎN PAKÊTA AHENGSAZİYA YEKÎTİYA EWROPAYÊ7

· Hêzdarkirina Azadiya Çapemeniyê: Bi guherîna Qanûna Çapemeniyê ve di çarçoveya sûcên çapemeniyê de tengkirin hate kirin, navbera cezayê girtina dezgehên çapemeniya ku nivîsa sûcê teşkîl dike ser hat weşandin ji «3 roj-1 mehî» guheriye û daketiye «1-15 rojî». Cezaya perayan jî ji teksa madê hatiye derxistin. (Madeya 2. ya Qanûna hejmara 4748)

· Girêdana Ewlehiyê Ya Azadiya Rêxistinbûyînê: Bi gûherîna madeyên 4, 5, 6, 34, 38 û 43. ya Qanûnên Komeleyanre sînorkirin 7 Qanûna bi dîroka 26/3/2002 ya bi hejmara 4748 (Rojnameya Fermî: 9/4/2002,

24721).

2002-2012

171

û qedexeyên ku derbarê bûyîna damezrînerê komeleyan û zimanê ku di feeliyetên de werin bikaranîn hate rakirin, di damezrandina komelayan jî ji pergala destûrê derbasî pergala ragîhandinê bû. (Madeya 5. ya Qanûna bi hejmara 4748)

· Firehkirina Mafê Xwepêşandanên Aştîxwaz: Bi guherîna madeyên 9, 17 û 19. ya Qanûna Meşa Merasîm û Çalakiyan ya bi hejmara 2911 re, di bikaranîna mafên civînê de «xwedîbûna ehlîyeta fîîlê û 18 saliya xwe tijîkirin» wek şertekî bes hate pejirandin û hukmên sînorkirinê yên derbarê lijneyên serastkirinê jî hatin rakirin. Ji aliyê din ve, sedemên sînorkirina mijara taloqkirin yan jî qedexekirina çalakiyan hate kêmkirin, hate pejirandin ku çalakiyên li bajêr yan jî navçeyan e werin

«qedexekirin» û «taloqkirin». (Madeyên 6. û 7. yên Qanûna bi hejmara 4748)

· Di Warê Partiyên Siyasî De Firehkirina Azadiya Rêxistinbûnê: Bi guherîna madeyên 101. û 102. ya Qanûna Partiyên Siyasî ya bi hejmara 2820 ve, wek alternatîfa girtina partiyên siyasî hukma «Ji alîkariya dewletê qismen yan jî bi temamî bêpar hîştîn» hat anîn. Bi guherîna madeya 103. ya heman qanûnê jî ji bo dijwartirkirina girtina partiyan «pîvana navendbûnê (odak olma)» hate kirin. (Madeya 4. ya Qanûna bi hejmara 4748)

· Çalakirina Sepandina Biryarên Dadgeha Mafên Mirovan Ya Ewropayê (AİHM): Bi guherîna Qanûna Derheqê Darizandina Karmendan û Peywirdarên Din Yên Gelemperîyê re tezmînata ku ji aliyê dewletê ve dihat dayîn ya ku piştî encama biryarên AİHMê yên ji ber sûcên îşkence û kirariyên xirab hatibûn dayîn, ji aliyê personelê berpirs ve were dayîn. (Madeya 3. ya Qanûna bi hejmara 4748)

· Hêzdarkirina Mafên Parastinê: Ji bo kesê hatiye girtin yan jî girtî yê, ku sûcê wî dikeve qada peywîra Dadgeha Ewlehiya Dewletê (DGM) bi pazêrê xwe re tenê hevdîtinê pêk bîne û bi vî

awayî jî mafê parastinê hêzdar bibe fikraya dawî ya madeya 16. ya Qanûna Derheqê Ûsilên Darizandin û Damezirandina Dadgeha Ewlehiya Dewletê (DGM) ji merîyetê hat rakirin. (Madeya 7. ya Qanûna bi hejmara 4748)

· Pêngavên Ji Bo Sivîlbûnê Hatin Avêtin: Bi rakirina ji merîyetê ya madeya 9. ya Qanûna Raye, Peywir û Teşkîlata Cendirme re rêya wekaletê ya serbazên cendirmeyan ku ji walî yan jî

qeymeqaman re dikirin hate girtin. Bi guherîna madeya 29. ya Qanûna Rêvebirinên Bajêr ve jî, bi tenê amîrên îdareya milkî dikare ji qeymeqamtiyan re wekaletê bike ku ev jî bi hukmê ve hate girêdan. (Madeya 7. ya Qanûna bi hejmara 4748)

SÊYEMÎN PAKÊTA AHENGSAZİYA YEKÎTIYA EWROPAYÊ8

· Rakirina Cezayê Mirine: Cezayê mirinê ku li Tirkiyê ji sala 1984an pê ve nedihat sepandin, wek li gor Protokola bi 6 nomre ya Pêvek ya Girêbesta Mafên Mirovan ya Ewropayê ji bilî şer, talûkeya şerê nezîk û sûcên terorê hat rakirin. (Madeya 1. ya Qanûna bi hejmara 4771)

· Li Gor Biryarên Dadgeha Mafên Mirovan Ya Ewropayê Anîna Derfeta Nûkirina Darizandinê: Di dozên hiqûq û cezayan de, li gor biryarên ku AİHMê yên bi şiklekî derfet dayîna jinûve darizandin bê kirin, di madeya bi hejmara 1086 ya Qanûna Dadrêsiya Ûsilên Hiqûqê û 1412 ya Qanûna Dadrêsiya Ûsilên Qanûnê (CMUK) de guherîn hate kirin. (Madeyên 6. û 7. Ya Qanûna bi hejmara 4771)

· Firehkirina Azadiya Çapemeniyê: Ji Merîyetê rakirina madeya 31 û 3. ya pêvek ya Qanûna Çapemeniyê ve hemû cezayên girtîgehê yên ji ber sûcên ku bi reya çapemeniyê hatine kirin, ji holê hatin rakirin û digel vê azadiya çapemeniyê û îfadeyê hate firehkirin. (Madeya 12. ya Qanûna bi hejmara 4771)

8 Qanûna bi dîroka 3/8/2002 ya bi hejmara 4771 (Rojnameya Fermî: 9/8/2002, 24841).

2002-2012

173

· Hêzdarkirina Azadiya Rêxistinbûnê: Bi guherîna madeyên 11, 12, 45, 47 û 62. ya Qanûna Komelayan ve hukmên hêsankirina

feeliyetên komeleyan pêk hatin. Bi guherînên madeyên 39 û 56. ya heman Qanûnê re jî astengîyên ku rê nedidan peywirdarên gelemperîyê û xwendekar bibin endamê komeleyan hatin rakirin. (Madeyên 3 û 12. ya Qanûna bi hejmara 4771)

· Bi Vekirina Kursên Taybet Re Dayîna Mafê Weşanê Ya Bi Ziman û Zaravayên Din: Bi guherînên Qanûna Derheqê Weşan û Damezrandina Televîzyon û Radyoyê û Qanûna Hindekarî û Perwerdehiya Zimanê Biyanî re sînorkirinên li hember mafên perwerde û weşan kirinê bi ziman û zaravayên biyanî yên hemwelatîyên Tirk di jiyana xwe ya de bi awayekî kevneşopî bikar tînîn hatin rakirin. (Madeyên 8 û 11. ya Qanûna bi hejmara 4771)

· Hêzdarkirina Mafê Xwepêşandana Aştîxwaz: Bi guherîna Qanûna Meşên Merasîm û Çalakiyan, li Tirkiyê di çalakiyan de cihgirtin û beşdarbûna kesên biyanî ji meşên merasîm û xwepêşandanan hate hêsan kirin ; maweya ragihandina lidarxistina merasîman ji 72 seetî ket 48 seetî û bi vî awayî jî azadiyên derbarê meşên merasîm û çalakiyan hate fireh kirin. (Madeya 5. ya Qanûna bi hejmara 4771)

· Rakirina Pirsgirêkên Milkên Weqfên Cemaetan: Bi guherîna madeya 1. ya Qanûna Weqfan, li ser mijara weqfên cemaetan karibin malên xeyrî menqûl bigirin û tesarufê bikin hêsantî hate kirin. (Madeya 4. ya Qanûna bi hejmara 4771)

RAKİRİNA REWŞA AWARTE

Di dîroka 18ê Cotmeha 2002yan de hikumeta nû hate damezrandin û piştî 12 rojan di dîroka 30.10.2002yan de bi girtina biryara dirêjkirina nû, dawî li sepandina Rewşa Awarte hate anîn. Bi vî awayî rejîma Rewşa Awarte ya ku di dîroka 19ê Tîrmeha 1987an de dest pê kir û

heta dîroka rakirinê 46 caran hate dirêjkirin bi dawî bû.
2003
2002-2012
177
2003
ÇAREMÎN PAKÊTA AHENGSAZİYA YEKÎTIYA EWROPAYÊ9
· Firehkirina Qadên Feeliyetên Komeleyan: Bi guherînên di Qanûna Komeleyan de hate kirin; derfet hate dayîn ku komele di nivîsandinên nêfermî de bikaribin zimanekî din bikar bînin, li cem kesên şexsî, hukmên şexsîtî jî bibin endamên komeleyan û komele bikaribin li der welat jî şaxên xwe vekin. Sînorkirinên li ser pêkanîna weşanê û belavokan hate sist kirin. Mecbûriyeta ku divê beriya belavkirina van belgeyan nimûneyekê ji Dozgeriya Komarê û meqamên têkîldar re were dayîn hate rakirin. (Madeya 20. ya Qanûna bi hejmara 4778)
· Di Qanûna Çapemeniyê De Guherîn: Bi guherîna ku madeya 15. ya Qanûna Çapemeniyê; kesên ku xwediyê weşana periyodîk, midûrê berpirsyar û xwediyê nivîsê bi zorê nabe ku jêderên xeberên xwe eşkere bikin û bi vî awayî jî hukmên parastina jêderan hate kirin. (M. 4. ya Qanûna bi hejmara 4778)
· Derbarê Sûcên Kirariyên Xirab û Îşkencê De Guherîn: Ji bo biryarên mehkumiyetê yên sûcên derbarê kirariyên xirab û îşkencê tecîl nebin û veneguherîn cezayê pere, di madeyên 243. (îşkence) û 245. (kirariyên xirab) yên Qanûna Cezaya Tirk de guherîn hate kirin. Di vê barê de; çarçoveya qadên sûcên kirariyên xirab û îşkencê hate firehkirin, ceza hate zêdekirin û 9 Qanûna bi dîroka 2/1/2003 ya bi hejmara 4778 (Rojnameya Fermî: 11/1/2003,

24990).
Şoreşa Bêdeng
178
tecîlkirin û veguherandina cezayê pere yê van sûcan hate asteng kirin. (M.1. Qanûna bi hejmara 4778)
· Dijwarkirina Girtina Partiyên Siyasî: Di mijarên endambûna partiyên siyasî û xebitîna partîyan de rêzikên hêj demokratîk hatin pêkanîn. Di vê çarçoveyê de girtina partiyên siyasî hate dijwar kirin. (Guherînên bi Qanûna bi hejmara 4778 ve di Qanûna Partiyên Siyasî ya bi hejmara 2820 de)
· Di Qanûna Komîsyona Lêkolîna Mafên Mirovan De Guherîn: Madeya 7/2. ya Qanûna Komîsyona Lêkolîna Mafên Mirovan hat guhertin, bi vî awayî hukim hate dayîn ku divê Komîsyon di encama serîlêdanên jêre hatin kirin de yan jî derbarê kirariyên hêj dewam dikin de herî dereng di nav 60 rojan de ji xwediyê serîlêdan kir re agahiyan bide. (Bi guherînên madeya 29. ya Qanûna bi hejmara 4778 ve)
· Qanûna Derheqê Darizandina Karmend û Peywirdarên Din Yên Gelemperîyê De Guherîn: Bi fikraya ku li ser madeya 2. ya Qanûna Derheqê Darizandina Karmend û Peywirdarên Din Yên Gelemperîyê hate lêkirin re; hate pêşbînîkirin ku di lêpirsîn û teqîbata madeyên 243 û 245 yên Qanûna Cezaya Tirk ya bi hejmara 765 û di çarçoveya fikraya 4. ya madeya 154. ya CMUKê de hatine vekirin de hukmên Qanûna bi hejmara 4483 ya derbarê pergala destûrê nayê sepandin. Bi vê guherînê re, derfet hate dayîn ku lêpirsînên ku li ser îdiayên kirariyên xirab û îşkencê û lêpirsînên derheqê peywirdarên gelemperîyê yên ku telîmatên mijara dadî yên Serdozgeriya Komarê nayînin cih de

re’sen vebin. (Bi guherînên madeya 33. ya Qanûna bi hejmara 4778)

· Di Biryarnameya Hukma Qanûnê (KHK) Ya Bi Hejmara 430 De Guherîn: Di madeya 3/c ya Biryarnameya Hukma Qanûnê ya Derheqê Tevdîrgirtinên Pêvek yên Pêvajoya Domandina Rewşa Awarte û Walîtiya Herêma Rewşa Awarte de guherîn

hate kirin.10 Bi vê guherînê ve maweya “10 rojî” ya benda (c) ya madeya 3. ya KHK ya bi hejmara 430 li gor guherînên Makezagonî ya bi hejmara 4744 hat pêşbînîkirin ku bikeve “4 rojî”. Dîsa bi heman guherînê ve hate mecbûrkirin ku dadger her car beriya biryargirtinê hikumxwar û girtî guhdar bike û rêya girtina ji girtîgeh yan jî saziya înfaza cezayê bitenê îfadegirtinê, rê nîşankirinê, hevrûniştinê, teşhîs û muayeneya tibî serîlê bide, hikumxwar û girtî di nav vê maweyê de ji mafên rewşa xwe yên qanûnî sûdewerbigire û ji girtîgeh an jî saziya înfaza cezayê di veqetîn û vegerînê de rewşa sihetiyê bir rapora doxtor ve were tesbîtkirin. Bi vî awayî ewlehiyên derbarê mafên girtî û hikumxwar hate hêzdar kirin. (Bi guherînên madeya 32. ya Qanûna bi hejmara 4778)

PÊNCEMÎN PAKÊTA AHENGSAZİYA YEKÎTIYA EWROPAYÊ11

· Li Gor Biryarên Dadgeha Mafên Mirovan Ya Ewropayê (AHİM) Rêvekirina Nûkirina Darizandina Hiqûq û Cezayê:

Li Tirkiyê ji ber biryarên AHİMê rêya jinûve darizandinê, bi Qanûna hejmara 4771 ya bi dîroka 3.8.2002 re hate vekirin. Lê hukmên derbarê jinûve darizandinê ya vê Qanûnê, bi hejmara

4793 ya vê Qanûnê ve hat guhertin bi madeyên 1, 2, 3 û 5. ya
vê Qanûnê jî ji sedemên AHİMê ve rêya jinûve darizandinê
10 Paragrafa yekem ya benda (c) ya madeya 3. ya Biryarnameya Hukma Qanûnê ya
Derheqê Tevdîrgirtinên Pêvek ya Pêvajoya Domandina Rewşa Awarte û Walîtiya
Herêma Rewşa Awarte ya bi dîroka 15/12/1990 ya Madeya 32. li gor şikla jêr hate
guhertin:
«Hikumxwar yan jî girtî, di lêpirsînên sûcên ku bûne sedama îlankirina rewşa
awarte de, j ibo îfade girtin, cih nîşankirin, hevrûbûn, teşhîs û muayenaya tibî li ser
pêşniyara Waliyê Herêma Rewşa Awarte, bi taleba Serdozgeriya Komarê û biryara
dadger ve, her car bi şerta ji «çar rojî» derbas nebe ji girtîgeh û saziya înfaza cezayê
dibe were rakirin. Ev mawe di girtîmayîn û hikumtiyê de tê hesibandin. Dadger, her
car beriya biryardayînê hikumxwar an jî girtî guhdar dike. Hikumxwar an jî girtî
ji girtîgeh û saziya înfaza cezayê hildanê jî ji mafên rewşa xwe ya qanûnî sûdewerdigire.
Ji girtîgeh yan jî saziya înfaza cezayê di veqetîn û vegerînê de rewşa sihetiya
girtî yan jî hikumxwaran bi rapora dixtor ve tê tespîtkirin.»
11 Qanûna bi dîroka 23/1/2003 ya bi hejmara 4793 (Rojnameya Fermî: 4/2/2003,

25014).
Şoreşa Bêdeng
180
hate serastkirin. Bi vê serastkirinê re, biryarên binpêkirinê yên AHİMê di dagehên hiqûq û cezayê de wekî sedama “lêvegera dadrêsiyê” hate hesibandin. Bi heman şiklî bi Qanûna hejmara 4928 û madeya 5. ya demkî ya ji Qanûna Ûsila Darizandina Îdarî hate lêkirin re biryarên binpêkirinê teqez wek sedema jinûve darizandinê hatin pejirandin. Bi CMK û HMK yên ku di dîroka 1.6.2005an de ketin merîyetê ve serastkirinên berê hatibûn pejirandin. Bi vî şiklî ji bo îhlalên ji biryarên darazê pêk tên ji holê werin rakirin û di vê mijarê de bicihanîna biryarên AHİMê palpişta hiqûqî hate ava kirin. (Madeya 375/1-i, HMK ya bi hejmara 6100; m. 311/1-f, CMK ya bi hejmara 5271)
· Di Qanûna Komeleyan De Guherîn: Cezayê girtîgehê yê ku ji ber milkstandin, dema tevgerên li dijî prosedûra destûra hewce û hukmên venêrînê pêk dihat ya di Qanûna Komeleyan de gih digirt, wek cezaya pereyê hate guherandin. Bi vî şiklî ji ber dijberiya hukmên navborî yên Qanûnê, rasthatina cezayên girêdana azadiyên şexsan hate astengkirin. (Guherîna made 82, Qanûna bi hejmara 2908 ya bi made 4 hat kirin, Qanûna bi hejmara 4793)
ŞEŞEMÎN PAKÊTA AHENGSAZİYA YEKÎTIYA EWROPAYÊ12
· Di Ziman û Zaravayên Cuda De Destûrdayîna Weşanê: Digel televîzyonên taybet li ber TRTê jî ji bo bilî zimanê Tirkî bi ziman û zaravayên din ve jî weşan were kirin astengîyên qanûnî hatin rakirin. (Guherîna madeya 4/1-4, Qanûna bi hejmara 3984 û madeya 14. ya Qanûna bi hejmara 4928)
· Di Qanûna Têkoşîna Li Dijî Terorê De Guherîn: Madeya 8.

ya bi sernavê “propagandaya li aleyhê dabeşnebûna Dewletê” ya Qanûna Têkoşîna Li Dijî Terorê (TMK) ya ku di AHİMê de dibû sedema mehkumiyeta Tirkîyê û li ber azadiya îfadeyê astengî derdixist hat rakirin. (Madeya 19/b ya Qanûna bi hejmara 4928)
12 Qanûna bi dîroka 15/7/2003 ya bi hejmara 4928 (Rojnameya Fermî: 19/7/2003,
25173).
2002-2012
181
Ji aliyê din di madeya 1. ya TMKê de guherîn hat kirin û kirina sûca terorê bi şerta şîdet û zorê ve girêdan. (Madeya 20 ya Qanûna bi hejmara 4928)
· Di Qanûna Berhemên Sînema, Vîdeo û Muzîkê De Guherîn: Pêgeha qedexekirina berhemên di vê qadê de, bi tenê sûcên dibertiya wesfên sereke yên Komarê û yekîtîya dabeşnebûna bi gel û welatê xwe ve ya dewletê hate sînorkiririn û tengkirin. Şert hate danîn ku biryarên qedexekirinê yên ku di vê çarçoveyê de ji aliyê meqamên îdarî ve hatine dayîn divê di nav 24 seetan de pêşkeşî erêkirina dadger werin kirin. Ji aliyê din ve ji Lijneya Venêrîna Berhemên Sînema, Vîdeo û Muzîkê nûnerê MGKê hate derxistin. (Madeyên 10, 11 û 12. ya Qanûna bi hejmra 4928)
· Rakirina Serastkirinên Qanûnî Yên Ku Di Kuştinên Tore û Namûsê De Daxistin Pêşbînî Dikir: Bi guherîna hate kirin re, di TCKê ya bi hejmara 765an de madeya 462. ya ku di kuştinên tore û namusê de daxistin pêşbînî dikir ji merîyetê hate rakirin. Di hinceta madeyê de hate dîyarkirin ku ev serastkirin ji ber ku medeya navborî di bûyerên kuştinên namûsê de neyên birkaranîn hatiye kirin. Ji aliyê din ve di madeya 453. ya TCKê

ya bi hejmara 765an de guherîna ku hate kirin re cezayên ku ji kuştinên ber saîqa toreyê pêk hatine re dihat dayîn jî hate zêdekirin. (Madeyên 1 û 19/a ya Qanûna bi hejmara 4928)

· Ji Bo Tescîlkirina Malên Xeyrî Menqûl (Mulk) Yên Weqfên Cemaetan Dirêjkirina Maweya Serîlêdanê: Bi guherîna ku di Qanûna Weqfan de hate kirin re, maweya ji bo serîledana ku li ser navê weqfê tescîlkirina malên xeyrî menqûl yên ku hate dîyarkirin di bin teserûfa weqfên cemaetan de ne, ji 6 mehan derket 18 mehan. (Madeya demkî ya ku bi madeya 2. ya Qanûna bi hejmara 4928 ve ji Qanûna Weqfan re hat lêkirin)

· Rakirina Astengiyên Ku Welatiyên Me Navên Li Gor Dilê Xwe Bidin Zarokên Xwe: Madeya 16. ya Qanûna Nifûsê û Qanûna Şoreşa Bêdeng

bi hejmara 4928 ya Derbarê Qanûnên Curbecur De Guherîn Werin Kirin hate guhertin û bi vî awayî li ber welatîyan rê hate vekirin ku bikaribin navên li gor dilê xwe bidin zarokên xwe. (Guherîna madeya 16/4-2 Qanûna bi hejmara 1587 ya bi madeya 5., Qanûna bi hejmara 4928)

· Firehkirina Azadiyên Derbarê Cihên Perestgehên Welatiyên Me Yên Xwedî Dîn û Baweriyên Cuda: Ji bo firehkirina azadiyên derbarê cihên perestgehên welatîyên me yên xwedî dîn û baweriyên cuda, di Qanûna Îmarê de guhertîn hate kirin. Bi vê guherînê ve cihên perestgehê yên din jî ketin ber pêgeha qanûnê. Bi vê guherînê ve ji aliyê din hate pêşbînî kirin ku “di tenzîmkirina plana îmarê de, hewcetiyên muhtemel yên şertên herêm û devera plankirî berbiçav were girtin û bi vî awayî cudakariya cihên perestgehê çêbibe”. Di vê çarçoveyê

de serastkirina “Li bajêr, navçe û bajarokan bi şertên ji amîrê îdareya milkî destûrgirtinê û li gor mewzûeta îmarê bibe, dibe perestgehxane were çêkirin” hate pêkanîn û bi vî awayî jî hat aramanckirin ku gazincên derbarê çêkirina perestgehxaneyên dînên din ji holê were rakirin. (Guherîna di madeya Pêvek ya 2. ya Qanûna Îmarê ya bi hejmara 3194 ya madeya 9. ya Qanûna bi hejmara 4928 de hat kirin.)

HEFTEMÎN PAKÊTA AHENGSAZİYA YEKÎTIYA EWROPAYÊ13

· Sivîlkirina Lijneya Ewlehiya Netewî (MGK): Di çarçoveya demokratîkbûnê de ji bo ku xebitîn û peywîrên Sekreteriya Giştî ya MGKê li gorî madeya 118. ya Makezagonê, ûsila tayînkirina Sekterê Giştî yê MGKê bi pêşniyara Serokwezîr û erêkirina Serokomar bibe hate pêkanîn. Raye û peywîrên Sekreterê Giştî yê MGKê jinûve hatin serastkirin û bi vî awayî jî rêya sivîlbûna Sekterê Giştî hat vekirin. Ji aliyê din ve, biryar hate girtin ku 13 Qanûna bi dîroka 30/7/2003 ya bi hejmara 4963 (Rojnameya Fermî: 7/8/2003,
25192).

2002-2012
183

MGK di du mehan carekê de bicive. (Guherînên di Qanûna bi hejmara 2945 û madeyên 25, 27. ya Qanûna bi hejmara 4963 de hatin kirin.)

· Di Qanûna Ûsila Darizandin û Damezrandina Dadgehên Eskerî De Guherîn: Bi vê guherînê ve Qanûna Cezayê Sivîl ji şexsên sivîl re qada sepandinê hate tengkirin. (Guherîna di madeya 11. Qanûna bi hejmara 353 ya bi madeya 6 ve, Qanûna

bi hejmara 4963)
· Guherîna Qanûnî Ya Derbarê Dozên Îşkencê De: Bi guherînê re; hate pêşbînîkirin ku doz wek “lezgîn” û “pêşanî” werin dîtin; ji 30 rojî zêdetir neyên taloqkirin û di betlaneyên dadî de jî dewam bike. Bi van serastkirina ve hate armanckirin ku di dozên derbarê îdiayên îşkencê de paşdemayînên dibe ku pêk were, bê astengkirin. (Made 7. Pêvek, CMUK bi hejmara 1412 ya bi madeya 5 ve, Qanûna bi hejmara 4963)
· Vekirina Qursên Taybet Ji Bo Hîndekarîya Zarava û Zimanên Cuda Pêkanîna Derfetê: Bi guherîna Di Qanûna Bi Hindekarî û Perwerdehiya Zimanê Biyanî ve Derheqê Hînbûna Zarava û Zimanên Cuda Yên Hemwelatîyên Tirk De hate kirin re, ji bo hînbûna zarava û zimanên cuda yên ku di jiyana rojane de bi awayekî kevneşopî têne bikaranîn derfeta vekirina kûrsên taybet hate dayîn. (Guherîna di madeya 2. ya Qanûna bi hejmara 2923 de ya bi madeya 23. ya Qanûna bi hejmara 4963)
· Di Qanûna Cezaya Tirk De Guherîn: Di madeya 159. ya TCKê de pêşbîniya heda asgarî ya cezayê sûca “dewlet û saziyên dewletê tehkîr û yekîtiya dabeşnebûna Komara Tirkiyê tehdît” ji salekê daket şeş mehan. Ji aliyê din ve, bi rakirina hukma cezakirina kirariyê jî ya “çawa dibe bibe tevgerên rexistinên terorê teshîl kirin” ve pêgeha madeya 169. ya TCKê ya serastkirina sûca “ji rexistinên terorê re alîkarî û piştevanî kirin” dikir hate tengkirin. (Di guherîna madeyên 1 û 2 ya bi hejmara 756 ya TCKê de, Qanûna bi hejmara 4963)
Şoreşa Bêdeng
184
· Di Şertên Endambûyîn û Damezrandina Komeleyan De Guherîn: Sînorkirinên derheqê kesên ku ji partî û komeleyên

ku bi biryara dadgehê hatine girtin re bûne endam yan jî sînorkirinên li ber kesên ku ji sûcên dîyarkirî hikum xwarine bibin damezrînerê komeleyan hatin kêmkirin. Ji xwendekarên Hîndekarîya bilind re derfet hate dayîn ku ne bi tenê di mijarên perwerdehî, hindekarî, moral û bêhngirtinê de di ser de di mijarên huner, çand û zanyarîyê de jî bikaribin komeleyan damezirînin. (Guherîna bi madeyên 11-17 ya Qanûna bi hejmara 4963)

· Firehkirina Derfetên Bikaranîna Mafên Xwepêşandan û Çalakiyê: Bi guherîna di Qanûna Meşên Xwepêşandan û Çalakiyan de hate kirin ve, maweya taloqkirina meşên xwepêşanda û çalakiyê hate kurtkirin, cezayên derbarê kiryariyên qedexe de jinûve hate serastkirin, bikaranîna mafê serastkirina meşên xwepêşandan û çalakiyê li ser hîma demokratîktirbûnê hate danîn. (Guherînên bi madeyên 18, 19. ya Qanûna bi hejmara 4963)

· Hêzdarkirina Mafên Zarokan: Li gor Peymana Mafên Zarokan ya Neteweyên Yekbûyî serastkirina, “Hemû kesên 18 saliyâ xwe temam nekirine zarok werin hesibandin” hate anîn û îstîsnaya derbarê qada peywira Dadgehên Zarokan de hate rakirin û bi vî awayî hate astengkirin ku zarok bilî van dadgehan neyên darizandin. (Bi serastkirina madeya 6. Qanûna bi hejmara 2253 û Qanûna bi hejmara 4963)

· Sazkirina Dadgehên Malbatê: Bi Qanûna Derbarê Ûsil, Darizandin û Peywir, Sazkirina Dadgehên Malbat ve Dadgehên Malbatê yên ku divê di bin banê xwe de psîkologek, pedegogek, pîsporekî xizmeta civakî bihewînin hate sazkirin û ji van dadgehan re bilî rayeya darizandinê ji bo parastina malbatê tevdîrên civakî, perwerdehî û parastinî bigire raye hate dayîn.

(Qanûna bi hejmara 4787 ya diroka 9/1/2003, Rojnameya Fermî: 18/1/2003, 24997)
2002-2012
185
· Hêsankirina Milkstandinê Ji Bo Weqfên Cemaetan: Bi guherîna rêziknameyê ve, standina xeyrî menqûl û li ser van tesarûfkirin ya weqfên cemaetan hate hêsankirin; şerta ku ji bo li ser navê weqfên cemaetan tescîlkirina van malên xeyrî menqûl divê ji Lijneya Wezîran destûr were girtin hate rakirin û hate pêkanîn ku ev destûr ji aliyê Miduriyeta Giştî ya Weqfan ve were dayîn. (Rêziknameya Derheqê Milk Standina Xeyrî Menqûl Yên Weqfên Cemaetan, Rojnameya Fermî: 24/1/2003, 25003)
· Ji Bo Li Hember Sûcên Dersînorbûyî Têkoşîna Bi Bandor û Zêdekirina Hevkariya Navnetewî: Ji bo li hember sûcên navnetewî yên narkotîk, penaberî, qaçaxçîtiya çekan û bazirganiya mirovan ku ji sînor derbas dibin têkoşîn were kirin "Peymana Neteweyên Yekbûyî Ya Li Hember Sûcên Rêxistinî Yên Dersînorbûyînê" û ji vê peymanê re "Protokolên Pêvek" ("Ji Peymana Neteweyên Yekbûyî Ya Li Hember Sûcên Rêxistinî Yên Dersînorbûyînê re Pêvek Protokola Derbarê Cezakirin, Sekinandin, Astengkirina Bazirganiya Mirovan Bi Taybetî Bazirganiya Jin û Zarokan" û "Ji Peymana Neteweyên Yekbûyî Ya Li Hember Sûcên Rêxistinî Yên Dersînorbûyînê re Pêvek Protokola Li Hember Qaçaxçîtiya Penaberan ya Bi Rêya Bejayî, Behr û Hewayê ") hate erêkirin. (Qanûnên bi hejmara 4800, 4803 û 4804 ya bi dîroka 30/1/2003, Rojnameya Fermî:4/2/2003, 25014)
· Di Bin Banê TBMMê De Sazkirina Komîsyona Ahengsaziya

Yekîtiya Ewropayê: Ji bo pêşketinên derbarê pêvajoya beşdariya YEyê ya Tirkiyeyê bişopîne û gotûbej bike, pêşketinên li YEyê çavderî bike û derbarê mijarên pêşketinan de TBMMyê agahdar bike û dema xwestinê biryarnameyên di hukma qanûnê, pêşnîyar û pêşnûmayên ji TBMMê re hatin pêşwazî kirin de li gor mewzûata YEyê lêkolînan bike û ji komîsyonên pîspor re nêrînan pêşkeş bike "Komîsyona Ahengasaziya YE" hate sazkirin. (Qanûna bi hejmara 4847 ya bi dîroka 15/4/2003, Rojnameya Fermî: 18/04/2003, 25084)

Şoreşa Bêdeng

186

· Erêkirina Peymana Hiqûqa Taybet Ya Li Hember Bêrêtiyê: "Peymana Hiqûqa Taybet Ya Li Hember Bêrêtiyê" ya ku di banê Konseya Evropayê de hate amade kirin û aramc dike ku pirsgirêkên di warê şexsan, saziyên dewletê, saziyên navnetewî û şîrketan de ji ber bêrêtiyê derdikevin ji holê rake, hate erêkirin. Peyman armanc dike ku kiryariyên bêrêtiyê yên ji ber pêwendiyên hiqûqa taybet dibe ku derkevin, ji kirdariyên cezayî zêdetir di çarçoveya hiqûqa taybet de were çareserkirin û astengkirin. (Qanûna bi hejmara 4852 ya bi dîroka 17/4/2003, Rojnameya Fermî: 24/4/2003, 25088)

· Erêkirina Pêymanên Gerdûnî Yên Derbarê Mafên Mirovan: "Peymana Navnetewî Ya Derbarê Mafên Çandî, Civakî û Aborî Ya Neteweyên Yekbûyî" "Peymana Navnetewî Ya Derbarê Mafên Siyasî û Şaristanî Ya Neteweyên Yekbûyî" ev herdu belge di dîroka sala 1966an de û wek "Belgeyên Cêwî" têne zanîn ku di qada mafên mirovan de herî girîngin û bi wesfeke gerdûnî ne ku di sala 2003yan hatine erêkirin. Bi erêkirina vê Peymanê ve,

krîtereke din ya siyasî ya di rêya endambûna YEyê ya Tirkiyeyê de hate bicihanîn. (Qanûna bi hejmara 4868 ya bi dîroka 4/6/2003 ya Derbarê Erêkirina Li Gor Peymana Navnetewî Ya Mafên Siyasî û Şaristanî; Qanûna bi hejmara 4867 ya bi dîroka 4/6/2003 Derbarê Erêkirina Li Gor Peymana Navnetewî Ya Derbarê Mafên Çandî, Civakî û Aborî, Rojnameya Fermî: 18/6/2003, 25142)

· Sazkirina Koma Çavderiya Reforman: Ji bo şopandina sepandina qanûnên ahengsaziya YEyê di dîroka 10ê Îlona 2003yan de "Koma Çavderiya Reforman" hate sazkirin. Ji aliyê din ve, ji bo li Ewropayê nasandina Tirkiyeyê "Koma Ragihandina YE" hat sazkirin.

· Ji Peymana Mafên Zarokan Ya NYyê Re Protokola Îxtiyarî Ya Pêvek Di Mijara Zarok, Di Cihgirtina Pevçûnên Çekdarî De Erêkirin: "Protokola Îxtîyarî Ya Pêvek Ya Di Mijara Zarok Di Cihgirtina Pevçûnên Çekdarî De Ya Ji Peymana Mafên Zarokan 2002-2012

187

Ya Neteweyên Yekbûyî Re Pêvek" ya ku ji bo hukmên di Peymana Mafên Zarokan Ya NYyê de werin sepandin, ya ku qedexe dikir ku zarokên ji panzdeh salî di pêvçûnan de cih bigrin û di pêvçûnên çekdarî de qaîdeyên hiqûqî yên însanî ji zarokan re jî werin sepandin hate erêkirin. (Qanûna bi hejmara 4991 ya bi dîroka 16/10/2003, Rojnameya Fermî: 21/10/2003, 25266)

· Pêşxistina Mafên Agahî Wergirtinê: Di dewletên hiqûqa demokratîk de demeke dirêje bi egera nêrîna rêvebirinê hesab dide, zelal û vekirî mafê agahî dayîne heye ku bi Qanûna Mafê Agahî Wergirtinê di mewzûata me de cih girtiye. (Qanûna bi hejmara 4982 ya bi dîroka 9/10/2003, Rojnameya Fermî:

24/10/2003, 25269)
· Rakirina Cezayê Mirinê: Tirkiyê, Protokola derbarê rakirina cezayê mirinê di dîroka 12/11/2003 de erê kir. (Ji Peymana Mafên Mirovan Ya Ewropayê Re Pêvek ya Protokola Bi Nomreya 6)
· Yekineyên Ewlehiyê Li Der Hiştina Lijneyên Mafên Mirovan Yên Navçe û Bajaran: Ji bo Lijneyên Mafên Mirovan yên Navçe û Bajêr beşdarîya sivîl zêde bibe û mafên însanan bê hêzdarkirin di rêziknameya têkîldar de guherîn hate kirin, ûniteyên ewlehiyê ji nav endamên lijneyê hatin derxistin. (Rojnameya Fermî: 23/11/2003, 25298)
· Ji Bo Hînkirina Zarava û Zimanên Cuda Vekirina Qûrsan: Ji bo hînkirina zimanên zarava û zimanên cuda vekirina kûrsan hate serbest berdan. Derbarê vê mijarê de serastkirin hatin kirin; rêzikname û mûfredat hate amadekirin. (Rojnameya Fermî: 5/12/2003, 25307)
2004
2002-2012
191
2004
HEŞTEMÎN PAKÊTA AHENGSAZİYA YEKÎTIYA EWROPAYÊ14
· Di Qanûna Hîndekarîya Bilind De Guherînên Hatine Kirin: Hukma ji Lijneya Hîndekarîya Bilind re ji aliyê Serokatiya Sererkaniyê ve endamek were hilbijartin ji merîyetê hate rakirin. (Hukma madeya 2/b ya Qanûna bi hejmara 5218 û hukma madeya 6/b-3 Qanûna bi hejmara 2547 ji merîyetê hate rakirin)
· Di Qanûna Derheqê Weşan û Sazkirina Televîzyon û Radyoyan De Guherînên Hatin Kirin: Bi guherînê ve, hukma

ku ji endambûna RTÜKê re ji aliyê Sekreteriya Giştî ya MGKê ve namzed dihat nîşan kirin ji merîyetê hate rakirin. (Bi madeya 2/d ya Qanûna bi hejmara 5218 ve 6/1-d ya Qanûna bi hejmara 3984 ji merîyetê hate rakirin)

· Di Qanûna Bêtel De Guherîn: Bi guherînê re, Sekreterê Giştî yê MGKê ji Lijneya Bilind Ya Ragihandinê hate derxistin. (Guherîna bi madeya 2/C ve ya Qanûna bi hejmara 5218 ve Qanûna bi hejmara 2813 hat kirin made 6/1)

· Cezayê Mirinê Bi Temamî Ji Mewzûatê Hate Derxistin: Bi Qanûna bi hejmara 5170 re, ji bo ku cezayê mirinê bi temamî ji Makezagonê were derxistin li ser hemû madeyên ku atif ji 14 Qanûna bi dîroka 14/7/2004 ya bi hejmara 5218 (Rojnameya Fermî: 21/7/2004,
25529).

cezayê mirinê re dikirin guherîn hatin kirin. (Madde 1, Qanûna bi hejmara 5218)

· Endambûna Koma Dewletan Ya Li Dijî Bêrêtiyê (GRECO): Tirkiyê ji dîroka 1-01-2004an pê ve ji “Koma Dewletan Ya Li Dijî Bêrêtiyê (GRECO)” ya ku di banê Konseya Ewropayê de cih digirt re bûye endam. GRECO ji bo têkoşîna li dijî bêrêtiyê mekanîzmayeke bi bandor û nerm e. Şerta ji bo tam endambûna GRECOyê ev e, divê dewletek ji aliyê GRECOyê girtina nirxandinê bê şert qebûl bike û di dema merheleyên nirxandinên beramberî de jî sînorkirinan ji holê rake. Armanca GRECOyê, çavnêrîkirina pergalên têkoşîna li dijî bêrêtiyê yên endaman e ku bi vî awayî destekdayîna mezinkirina kapasiteyan e.

· Erêkirina Peymana Li Ser Xizmetên Sihetiya Kar û Permana Derbarê Qada Xabatê û Ewlehî û Sihetiya Kar: Tirkiye, hewl dide ku, di mijarên ewlehiya civakî û xebatê de bigihîje standardên navnetewî û van standardan derbasî jiyanê bike û bi vî awayî jî rewşa ku tê de ye her ku biçe bilindtir bike, ji bo vê jî di mijara ji serastirinên navnetewî re piştevanbûn û sepadinê de wek nîşaneya biryardariya xwe “Peymana Derbarê Qada Xebat û Ewlehî û Sihetiya Kar ya bi hejmara 155” û “Peymana Derbarê Xizmeta Sihetiya Kar ya bi hejmara 161” erê kir. (Qanûnên bi hejmara 5038 û 5039 ya bi dîroka 7/1/2004, Rojnemeya Fermî: 13/1/2004, 25345)

· Erêkirina Peymana Derbarê Hevkariyê Ya Li Ser Mijara Ewladgirtina Navdewletî û Parastina Zarokan: Ji bo zarokên bêxwedî û li wan nayê nêrîn bigihîjîn malekê di vê çarçoveyê de sepandina ewladgirtina navdewletî li gor sûda zarok û şikla ahengiya mafên ku ji aliyê hiqûqa navnetewî ve, hatiye qebûl kirin çêbibe “Peymana Derbarê Hevkariyê ya Di Mijara Ewladgirtina Navdewletî û Parastina Zarokan De” hate erêkirin. Bi vê peymanê ve hat armanckirin ku rê li ber revandina zarokan û bazirganiya zarokan were girtin.

(Qanûna bi hejmara 5049 ya bi dîroka 14/1/2004, Rojnameya Fermî: 20/1/004, 25352)

· Erêkirina Peymana Hiqûqa Cezayê Ya Li Dijî Bêrêtiyê: Wek nîşandana biryardariya têkoşîna li dijî bêretiyê ya welatê meku kiryariyên bêrêtiyê dixe rewşa sûc û ji bo teqîbatkirina li ser van sûcan “Peymana Hiqûqa Cezayê Ya Li Dijî Bêrêtiyê” ya li bin banê

Konseya Ewropayê ye hate amadekirin, ku hevkariyeyeke bi hêz û mekanîzmayeke şopandinê ya bi bandor dihat pêşbînî kirin hate erêkirin. (Qanûna bi hejmara 5065 ya bi dîroka 14/1/2004, Rojnameya Fermî: 20/1/2004, 25352)

· Di Girtina Personelan De Li Gor Rêgeza Wekheviyê Tevgerîn: Bi Giştînameya Serokwezîrtiyê re, hate xwestin ku ji aliyê hemû sazî û dezgehên gelemperîyê ve, di xebatên girtina personelan de, divê şertên serîlêdanê li gor hewcetiya xizmetê dîyar bibe û bi şiklekî nebe sedema di navbera welatîyan de cudahî were kirin bê tevgerîn. (Giştînameya bi hejmara 2004/7, Rojnameya Fermî: 22/1/2004, 25354)

· Di Ziman û Zaravayên Cuda De Pêkanîna Derfeta Weşana Televîzyon û Radyoyê: "Derheqê Weşana Ziman û Zaraveyên Cuda Yên Ku Hemwelatîyên Tirkiyê Di Jiyana Xwe Ya Rojane De Bi Awayekî Kevneşopî Bikar Tînin De Rezikname" hate amedekirin û kete Merîyetê. Bi vî şiklî li ber ziman û zaravayên cuda ji bo weşana radyo û televîzyonê rê hate vekirin. (Rojnameya Fermî: 25/1/2004, 25357)

· Girêbestên Navnetewî Yên Derbarê Mafên Bingehîn û Di Pergala Hiqûqa Navxweyî De Derxistina Rewşeke Serdest: Ji peymanên navnetewî yên qada mafên mirovan re li gor mewzûta navxweyî serdestî hate dayîn. Bi pêveka guherîna di madeya 90. ya Makezagonê de hate zêdekirin re, bi serastkirina "Heke di navbera girêbestên derbarê azadî û mafên bingehîn yên li gor ûsilê ketine merîyetê û di qanûnên heman mijarê de ji ber ku

hukmên cuda dihewînin de lihevnekirin derkeve holê, hukmên

girêbestên navnetewî wekî esas têne qebûl kirin, ” ev hukma bi girêbestên navnetewî yên derbarê azadî û mafên bingehîn û qanûnên ku di heman mijarê de hukmên cuda dihewînin li hev negirin, hukmên girêbestên navnetewî weke esas têne qebûl kirin haet pêkanîn. Bi vê serastkirinê re hate armanckirin ku hiqûqa navxweyî bi hiqûqên mafên mirovan yên navnetewî ve bendgirtî be. (Guherînên bi Qanûna bi hejmara 5170 ya bi dîroka 7/5/2004)

· Erêkirina Peymana Ewropayê Ya Derbarê Kesên Beşdarî Pêvajoya Darizandina Li Hember Dadgeha Mafên Mirovan Ya Ewropayê (AHİM) Dibin: Ev Peyman ji aliyê Tirkiyeyê ve bi ramana ji kesên ku li hember AHİMê werin teqîbkirin re ji bo girêdanî û hêsanêyê pêk bîne hate çêkirin û di dîroka 3/7/2002ê de hate îmzekirin. Hukmên vê Peymanê, derheqê hemû kesên teqîbata wan ji aliyê AHİMê ve tê kirin, nûner û şêwirmendên wan û şahid û pîsporên ku beşdarî teqîbatê bibin ji aliyê AHİMê ve hatin vexwendin û kesên ku ji aliyê serokê AHİMê ve hatin vexwendin de tê sepandin. (Qanûna bi hejmara 5166 û ya bi dîroka 5/5/2004, Rojnameya Fermî: 10/5/2004, 25460)

· Sazkirina Lijneya Etîk Ya Peywirdarên Gelemperîyê: “Qanûna Derheqê Hin Qanûnan De Guherîn û Sazkirina Lijneya Etîk Ya Peywirdarên Gelemperî” ya ku pêşbînî dikir “Lijneya Etîk Ya Peywirdarên Gelemperîyê” saz bibe ku ji bo sepandinê çavnerî bike û dîyarkirina tevgerên etîk yên wekî çavnerîkirina sûda gelemperîyê, hesabdayîn, dirûstbûn, bêalîbûn, zelalbûn ku divê peywirdarên gelemperîyê girêdayî wan bin, hate qebûl kirin. (Qanûna bi hejmara 5176 ya bi dîroka 25/5/2004, Rojnameya Fermî: 8/6/25486)

· Erêkirina Peymana Derbarê Destdanîn, Destxistin, Lêkolandin û Paqijkirina Hatiniyên Ji Jêderên Sûcan Tên Girtin: Ji bo astengkirina sûcên paqijkirina qezencên bi rêyên
2002-2012
195
derqanûnî yên wekî madeya tîryak, qaçaxçîtîya çekan, bazirganiya mirovan, jêderên ji terorê hatine bidestxistin “Peymana Derbarê Destdanîn, Destxistin, Lêkolandin, Paqijkirina Hatiniyên Ji Jêderên Sûcan Tên Girtin” hate erêkirin. (Qanûna bi hejmara 5191 ya bi dîroka 16/6/2004, Rojnameya Fermî: 22/6/2004, 25500)
· Derxistina Qanûna Çapemeniyê Ya Nûjen: Di sala 2004an de bi hişmendiya azadiya çapemeniyê çiqas ji bo kesên ku wê rêyê bikar tînin azadiyek e, ji bo girseyan jî mafekî bingehîn e ku Qanûna Çapemeniyeke nû ya bi hejmara 5187 hate derxistin, sepandinên dibûn sedema destdanîna ser amûrên çapêgirtina weşanxaneyan hate rakirin. (Rojnameya Fermî: 26/6/2004, 25504)
· Rakirina Dadgehên Ewlehiya Dewletê (DGM): DGM yên ku heyamen rewşa awarte bi bîr dixistin û di warê darizandina dadî de her tim dibûn mijara rexne û gengeşiyê di sala 2004an de hatin rakirin. Bi dawîkirina sepandina Rewşa Awarte û rakirina DGMyan, li Tirkiyeyê ji bo dawîbûna heyamekê û ji bo demokratîkbûna destpêkirina heyameke nû, bûn nîşaneyên herî şênber. (Qanûna Derbarê Rakirina Dadgehên Ewlehiya Dewletê û Di Qanûna Ûsila Dadrêsiya Cezayan De Guherîn Kirin bi hejmara 5190 ya bi dîroka 16/6/2004, Rojnameya Fermî: 30/6/2004, 25508)

· Rakirina Rayeya Di Mijara Doz Vekirinê De Ji Dozgerên Komarê Re Telîmatdayîna Wezareta Dadê: “Ji bo vekirina doza gelemperîyê ji Dozgerên Komarê re raya fermandayînê ya Wezareta Dadê” ya di madeya 148. ya CMUKa berê de hatibû serastkirin bi Qanûna bi hejmara 5219an hate rakirin. Ji aliyê din ve, di pêgeha reforma qanûnên cezayên bingehîn de cihê CMUKa berê kete merîyetê ku di CMK ya nû de jî ji Wezareta Dadê re rayeyeke wisa nehat dayîn. (Qanûna bi hejmara 5219 ya bi dîroka 14/7/2004, Rojnameya Fermî: 21/7/2004, 25529)

Şoreşa Bêdeng

196

· Hêzdarkirina Rêvebirinên Herêmî: Ji bo serastkirina statûya hiqûqî ya rêvebirina şaredariyên mezin, plansazîbûna zêdetir ya xizmetan, programan, bandore wan, sûdewar û bi ahengî birêveçûna rêvebirîyên herêmî jib o di asta bajarên mezin de hêzdar bibe Qanûna Bajarên Mezin hate derxistin. (Qanûna bi hejmara 5216 ya bi dîroka 10/7/2004, Rojnameya Fermî: 23/7/2004, 25531)

· Tenzîmkirina Zirarên Mexdûrên Terorê: Ji bo bi awayekî lezgîn, bi bandor û bi dadî zirarên welatîyên me di pêgeha kirinên teror û têkoşîna li dijî terorê de zirar girtine were tenzîmkirin, “Qanûna Derheqê Ji Ber Teror û Têkoşîna Li Dijî Terorê Pêk Tên Tenzîmkirina Ziraran” kete merîyetê. Bi awayekî bandorker bi sepandina vê qanûnê re zirarên xeyrî menqûl, menqûl, seqetbûn, birîndarbûn, mirinê û ji ber neragihîna hebûna malên welatîyên me têne tenzîm kirin. (Qanûna bi hejmara 5233 bi dîroka 17/7/2004, Rojnameya Fermî: 27/7/2004, 25535)

· Sazkirina Dadgehên Îstînaf: Ji bo pêşxistina standardên

darizandina dadî û sivikkirina barê kar ya di dadê de “Qanûna Derheqê Raye, Peywîr, Sazkirina Dadgehên Dadiya Herêmî û Dadgehên Dereceye Ewil Daraza Dadî” hate derxistin. (Qanûna bi hejmara 5235 bi dîroka 26/9/2004, Rojnameya Fermî: 7/10/2004, 25606)

· Pêkxistina Azadiya Rêxistinbûneke Li Gor Standardên Peymana Mafên Mirovan Ya Ewropayê (AİHS): Ji bo rêvebirineke demokratîk derbasî jiyanê bibe, civaka hêzdar bibe û azadiya rêxistinbûnê derkeve holê “Qanûna Komeleyan” kete merîyetê û bi vî awayî sînorkirina mafê sazkirina komeleyan hate rakirin, li gor AİHSê azadiyeke rêxistinbûnê hate pêkanîn. (Qanûna bi hejmara 5253 ya bi dîroka 4/11/2004, Rojnameya Fermî: 23/11/2004, 25649)

2005

2002-2012

199

2005

· Erêkirina Protokola Tadîl Ya Peymana Ewropayê Ya Rêlibergirtina Terorîzmê: Tirkiyê wek nîşankirina girîngîdana hevkariya navnetewî ya li dijî terorîzmê, «Protokola Tadîl Ya Peymana Ewropayê Ya Libergirtina Terorîzmê» erê kir. Bi vê Protokola behskirî re bi hejmara beşên sûcên terorê ya di «Peymana Ewropayê ya Libergirtina Tedhîşçîtiyê» ya bi dîroka 1997an de cih digirt lê zêde kir û peymanên nû ji lîsteya sûcên ku wek sûc nayên hesibandin lêkir. (Qanûna bi hejmara 5288 ya bi dîroka 13/1/2005, Rojnameya Fermî: 18/1/2005, 25704)

· Piştî Lêkolandina Sedemên Tundiyê Yên Li Hember Zarok û Jin Yên Ji Ber Tore û Kuştinên Namûsê Pêk Tên Ji Bo Tevdîrên

Bên Girtin Sazkirina Komîsyona Lêkolînê Ya Meclîsê: Bi boneya piştî lêkolandina sedemên şîdetê yên li hember zarok û jinan yên ji ber tore û kuştinên namûsê pêk tên, ji bo tevdîrên bên girtin, biryar hate dayîn ku Lêkolîna Meclîsê were vekirin û Komîsyoneke Lêkolîna Meclîsê were sazkirin. (Biryara bi hejmara 849 ya bi dîroka 18/5/2005, Rojnameya Fermî: 26/5/2005, 25826)

· Bi Qanûnên Nû Yên Bingehîn Pêkanîna Binesaziya Pergala Dadê Ya Cezayê Ya Nûjen: Ji bo pêkanîna pergala dadê ya cezeyeke nûjên ya ku karaktereke azadîxwaz dihewîne û li gor esasa rêzgirtina rûmeta mirovan be, Qanûna Cezaya Tirk ya bi hejmara 5237, Qanûna Dadrêsiya Cezaya 5271, Qanûna Qebehatan ya bi hejmara 5326, Qanûna Derheqê Tevdîrên Ceza û Ewlehiya Înfazê ya bi hejmara 5275 û Qanûna Qaîdeyên Şoreşa Bêdeng

Parastinê, Navenda Alîkariyê, Serbestiya Bi Venêrîn ya bi hejmara 5402 hate derxistin.

· Zêdekirina Cezayê Ya Firehkirina Nasandina Sûcên Îşkencê: Bi Qanûna Cezayê ya Tirk (TCK) ya bi hejmara 5237 ya di dîroka 1/6/2005ê de kete merîyetê re, nasandina sûcên îşkencê hate firehkirin, cezayê wê hate zêdekirin.

· Girankirina Cezayê Bikaranîna Hêza Bê Pîvan: Di madeya 256 ya TCKê de hate pêşdîtin ku peywirdarên gelemperîyê yên ku xwedî rayeya bikaranîna zorê ne, dema ku peywîra xwe bi cih tînin, heke li hember kesan ji pîvana hewce zêdetir hêzê bikar bîne, hukmên derbarê sûcên bi zanayî birîndarkirinê werin sepandin. Bi vî awayî cezayê ku sînorê wê yê binî sê meh e hate zêdekirin. (Bi serastkirina TCKê ya bi hejmara 5237 ya ku di

dîroka 1/6/2005ê de kete merîyetê)
· Başkirina Şertên Binçavkirinê: “Rêziknameya Girtin, Binçavkirin û Îfade Girtinê” ya nû hate derxistin ku bi vî awayî şert û şiklên sepandina ewlehiyên li çarçoveya azadî û mafên bingehîn yên rayeya binçavkirinê hatin pêşbînî kirin, xizm û eqrebeyên ji kesên binçavkirî re xeberdayîn, kirdariyên nezaretxanê bi rengekî hurgilî hatin serastkirin. Di ser de odeyên nezretxanê û îfadegirtinê li gorî normên mafên mirovan hatin pêkanîn. (Rêziknameya berê bi dîroka 1988an bû, ya nû di Rojnameya Fermî ya bi dîroka 1/6/2005an de bi hejmara 25832yan ve hate weşandin)
· Qebûlkirina Qanûna Astengdaran: “Qanûna Derheqê Di Biryarnameyên Hukma Qanûnê, Hin Qanûnan û Astengdaran De Guherîn Were Kirin” ya ku armanc dike mafên astengdaran biparêze, pêşve bibe û “mafê rastî cudakariyê neyê” yê astengdaran bigire bin ewlehiyê, hate qebûl kirin. (Qanûna bi hejmara 5378 ya bi dîroka 1/7/2005, Rojnameya Fermî: 7/7/2005)
2002-2012
201
· Hêzdarkirina Rêvebirinên Herêmî:
o Qanûna Îdareya Taybet Ya Bajêr: Bi Qanûna Rêvebirina Taybet ve, dezgeh, teşkîlat, berpisyarî, raye û peywîra Rêvebirina Taybet ya Bajêr bi çarçoveya prensîba “di xizmetê de devertî” bi şiklê xizmetdayînê gihîşt xweseriya aborî û îdarî. (Qanûnê bi hejmara 5302 ya bi dîroka 22/2/2005, Rojnameya Fermî: 4/3/2005, 25745)
o Qanûna Yekîtiya Rêvebirinên Taxî: Bi Qanûna Yekîtiya Rêvebirina Taxî re, Yekîtiya Qanûna Taxî ya ku ji berê ve

hatibû sazkirin ya ku ji bo hin xizmetên devertî ji aliyê Rêvebirinên Taxî bi awayekî şirîkatî were kirin, cara ewil gihîşt statûya qanûnî û berpirsyarî, raye, peywîr, rêvebirtî, dezgeh, sazkirin, statûya hiqûqî ya yekîtiyên taxî ya nû wera damezrandin bi hukmê ve hate girêdan. (Qanûna bi hejmara 5355 ya bi dîroka 26/5/2005, Rojnameya Fermî: 11/6/2005, 25842)

o Qanûna Şaredariyê: Bi Qanûna Şaredariyê ve, dezgeh, binesaziya teşkîlatê, berpirsyarî, raye û peywirên Şaredariyan jinûve hatin nasandin û rêvebirinên şaredariyê li gor çarçoveya prensîba "di xizmetê de devertî" bi awayekî xizmetdayînê gihîşt xweseriya aborî û îdarî. (Qanûna bi hejmara 5393 ya bi dîroka 3/7/2005, Rojnameya Fermî: 13/7/2005)

· Qebûlkirina Qanûna Parastina Zarokan: Ji bo maf û parastinên zarokên ku ber bi sûc herikîne an jî hewcehiya wan bi parastina taybet heye bigirin bin temînatê "Qanûna Parastina Zarokan" hate qebûl kirin. Bi vê Qanûnê ya bi girîngîdayîna tevdîrên piştgirî û parastinî hate amadekirin re, Dadgehên Zarokan ne bi tenê sûcên ku zarokbikin, ji aliyê din ve, wek derbarê pêvajoya îstîsmarkirin û îhmalkirina her cureyî ya ku zarok rast tên hatin peywîrdarkirin. (Qanûna bi hejmaraa 5395 ya bi dîroka 3/7/2005, Rojnameya Fermî: 15/7/2005, 25876)

Şoreşa Bêdeng

202

· Qebûlkirina Qanûna Lijneyên Parastinê û Navendên Alîkariyê û Venêrîna Serbestî: Ji bo ku, hukimxwarên di saziyên înfaza cezayan de demeke dirêj dimînîn, piştî înfazkirina cezayên xwe bê tevdîr bên serbest berdan, pirsgirêkên ku li ber hukimxwaran,

malbatên wan û giştiya cîvakê derdikevin holê werin safîkirin “Qanûna Lijneyên Parastinê û Navendên Alîkariyê û Venêrîna Serbestî” hate qebûl kirin. (Qanûna bi hejmara 5402 ya bi dîroka 3/7/2005)

· Erêkirina Peymana Gerdûnî Ya Derbarê Mafên Mirovan: “Protokola Îxtiyarî Ya Duyemîn Ya Bi Peymana Navnetewî Ya Derbarê Mafên Siyasî û Şaristanî Ya NYyê Ya Armanc Dike Ku Cezayê Mirinê Were Rakirin Re Pêvek” û “Protokola Îxtiyarî Ya Yekem Ya Bi Peymana Navnetewî Ya Derbarê Mafên Sîyasî û Şaristanî Ya NYyê Re Pêvek” hate erê kirin. (Qanûna bi hejmara 5415 ya bi dîroka 28/10/2005, Rojnameya Fermî: 2/11/2005, 25984; Qanûna bi hejmara 5468 ya bi dîroka 1/3/2006, Rojnameya Fermî: 17/3/2006, 26111)

2006

2002-2012

205

2006

· Erêkirina Peymana Parastina Mîrata Çandî Ya Neşênber: “Peymana Parastina Mîrata Çandî ya Neşênber” ya ku armanc dikir ku mîrata çandî ya ne şênber bê parastin, li ber mîrata çandî ya cîvakî, komî û şexsî rêz were girtin, di mijara mîrata çandî ya navborî de di asta navnetewî, netewî û herêmî de hesasiyet were zêdekirin, nirxgirtina hembertî pêk were, hevkarî û alîkariya navnetewî mimkun bibe, hate erê kirin. (Qanûna bi hejmara 5448 ya bi dîroka 19/1/2006, Rojnameya Fermî: 21/01/2006, 26056)

· Sazkirin û Xistina Feeliyetê Ya Ajansên Pêşveçûyînê: Bi “Qanûna Derheqê Peywîr, Kordînasyon û Sazkirina Ajansên

Pêşveçûyînê” ve ji bo di navbera girseya gelemperî, girseya taybet û saziyên cîvaka sivîl de hevkariyê pêşve bibe, bi boneya kêmkirina ferqa pêşveçûyînê ya di navbera herêman û nav herêmê de tevgerdarkirina potansîyela herêmî, hate pêşbînî kirin ku Ajansên Pêşveçûyînê werin sazkirin. Piştre di çarçoveya hukmên qanûnê de bi biryara Lijneya Wezîran ya bi nomreya 2006/10550 ve 2, biryara bi nomreya 2008/14306 ve 8 û biryara bi nomreya 2009/15236 ve jî 16 bi tevahî 26 Ajansên Pêşveçûyînê hatin sazkirin. (Qanûna bi hejmara 5449 ya bi dîroka 25/1/2006, Rojnameya Fermî)

· Erêkirina Protokola Bi Nomreya 13 Ya Pêvek Ya Bi Peymana Mafên Mirovan Ya Ewropayê Re (AİHS): Kiryariyên erêkirina “Protokola Bi Nomreya 13 Ya Pêvek Ya Bi AİHSê Re” ya ku cezayê Şoreşa Bêdeng

206

mirinê bi her şertî radike di Sibata 2006an de hat temamkirin û bi vî awayî Protokola navborî ji bo welatê me kete merîyetê. Bi vê kirinê re bi yekbûyîna standardên Ewropayê ya welatê me pêngaveke girîng ya din jî hate avêtin. (Protokola Ya Bi Nomreya 13 Ya Pêvek Ya Bi AİHS Re)

· Erêkirina Peymana Têkoşîna Li Dijî Bêretiyê Ya Neteweyên Yekbûyî: Tirkiye, wek nîşandana biryardariya têkoşîna li dijî bêrêtiyê, “Peymana Têkoşîna Li Dijî Bêrêtiyê Ya Neteweyên Yekbûyî” ya bi dîroka 2003an di qada xwe de belgeya herî ewil û bi pêgehê erê kir. (Qanûna bi hejmara 5506 ya bi dîroka 18/5/2006, Rojnameya Fermî: 24/5/2006, 26177)

· Erêkirina Protokola Bi Nomreya 14 Ya Pêvek Ya Bi AİHSê Re: Protokola Bi Nomreya 14 ya derbarê guherandina mekanîzmaya

venêrîna AHİSê pêk anî, hate erêkirin. Protokola navborî, ji ber her tim zêdebûna barê kar ya Komîteya Wezîran Ya Konseya Ewropayê û AİHSê, ji bo di dema dirêj de pêkanîna çalakî û pêşvebirina pergala venêrînê di hin hukmên AİHSê de guherînan dike. (Qanûna bi hejmara 5512 ya bi dîroka 1/6/2006, Rojnameya Fermî: 6/6/2006, 26190)

· Hêzdarkirina Tevdîrên Libergirtina Kuştinên Namûs, Tore û Tevgerên Şîdetê Yên Li Hember Jin û Zarokan: Bi Giştînameya Serokwezîrtiyê ya derbarê mijarê hate derxistin re, pêşniyarên têvdîrên bêne girtin yên di vê mijarê de, saziyên berpirsê koordînasyonan bi lîsteyan hatin dîyarkirin. Bi saya vê, bi raporên sê mehî yên ji Wezeratên têkîldar têne girtin ve sepandin hatin şopandin. (Giştîname ya bi hejmara 2006/17, Rojnameya Fermî:4/7/2006, 26218)

· Derxistina Qanûneke Îskanê Ya Nû: Bi Qanûna Îskana nû ve, Qanûna Îskanê ya bi hejmara 2510 hate pûç kirin, hukmên cudakarî yên li hember qereçîyan ji holê hate rakirin. (Qanûna bi hejmara 5543 ya bi dîroka 19/9/2006, Rojnameya Fermî: 26/9/2006, 26301)

2002-2012

207

· Erêkirina Şertên Civakî Ya Ewropayê Ya Berbiçavkirî: Ji bo cihê Şerta Civakî Ya Ewropayê ya bi dîroka 1961ê ya welatê me jî alîgir bû, erêkirina “Şerta Civakî Ya Ewropayê Ya Berbiçavkirî” ya ji aliyê Konseya Ewropayê ve di dîroka 1996an de hate qebûlkirin ku di cih de hate dîtin. (Qanûna bi hejmara 5547 ya bi dîroka 27/9/2006, Rojnameya Fermî: 3/10/2006, 26308)

2007

2002-2012

211
2007
· Ji Merîyetê Rakirina Qanûnên Ku Derfet Nemane Werin Sepandin: Ji bo zêdekirina qelîteyan, sivikkirna mewzûatê, serastkirina hukmên nakok, paqijkirina hukmên sepandinan ku rojanebûna xwe winda kirine «Qanûna Derbarê Ji Merîyetê Rakirina Hin Qanûnên Ku Derfeta Sepandinê Nemaye» hate qebûl kirin. (Qanûna bi hejmara 5637 ya bi dîroka 26/4/2007, Rojnameya Fermî: 2/5/2007, 26510)
· Ji Aliyê Gel Ve Hilbijartina Serokomar: Bi guherîna Makezagon bi encama dengdayîna gel ve ya ku di dîroka 21ê Cotmeha 2007an de pêk hat ve15 bingeha “Serokomar bi dengdayîna gel bê hilbijartin” hate pêkanîn. Bi vê serastkirinê re hukm hate danîn ku kesek herî zêde dikare du caran (5 sal+5sal) wek Serokomar were hilbijartin, di mijara namzed nîşankirina Serokomar de jî rêbazeke demokratîk hate qebûl kirin. Li gor vê serastkinê namzed nîşankirina Serokomar, ji navbera endamên TBMMyê yan jî derva bi pêşniyara nivîskî ya ji aliyê 20 parlamenteran ve mimkun dibe. Di ser de jî ji partiyên ku hilbijartina giştî ya parlamenteriyê ya dawî de ji sedî 20 dengên derbasdar girtine ne
15 Li gor Qanûna Derheqê Guherînên Makezagon Pêşwaziya Gel Bike De ya bi hejmara
3376 ya bi dîroka 23/5/1987, ji bo pêşwazîkirina dengê gel, bi encama dengdayîna
gel ya di dîroka 21/10/2007an de hate kirin ve, «Qanûna Derheqê Di Hin Madeyên Qanûna Bingehîn Ya Komara Tirkiyeyê De Guherîn Were Kirin» ya bi hejmara

5678 ya bi dîroka 31/5/2007 û Qanûna hejmara 5697 ya bi dîroka 16/10/2007
di Rojnameya Fermî de hate weşandin, ya hejmara 26554 bi dîroka 16/6/2007, bi
encama dengdayîna gel ya di dîroka 21/10/2007ê de hate kirin de hate qebûl kirin û
Biryara Lijneya Hilbijartina Bilind ya derbarê vê di Rojnameya Fermî ya di dîroka
21/10/2007ê de hate weşandin.
Şoreşa Bêdeng
212
re jî bi awayekî hevpar ku bikaribin namzedê Serokomar nîşan bikin derfet hate dayîn.
· Daxistina Çar Salan Ya Hilbijartinên Giştî: Bi heman guherînê ve hukm hate dayîn ku hilbijartinên giştî yên pênc salî carekê dihatin kirin, çar salan carekê werin kirin.
· Jinûve Serastkirina Nîsaba Hejmara Bes Ya Biryarê û Civînê Ya TBMMê: Bi guherîna navborî re, hilbijartin jî di nav de di hemû kirdariyên TBMMê de, serastkirin hate kirin ku TBMM herî kêm ji sisê yek bi hejmara tam ya endaman dikare kom bibe. Bi guherînê re hate armanckirin ku li ber rewşa ne dîyar û bê îstîqrara hiqûqî ya ku piştî çarçoveya “Biryara 367an” ya Dadgeha Makezagonê di pêvajoya hilbijartina Serokomar ya sala 2007an de pêk hatibû, were girtin.
· Qebûlkirina Qanûna Derbarê Pêgeh û Hêla Hiqûqî Ya Revandina Zarokan Ya Navneteweyî: Ji bo sepandina “Peymana Derbarê Hêlên Hiqûqî Ya Revandina Zarokan Ya Navnetewî” ya ku bi binpêkirina mafê welayetê, ji welatekî alîgir

yê din re lêvegerandina meskenê mutat yê zarokê revandî, yan jî bikaranîna mafê pêwendîya şexsî “Qanûna Derbarê Pêgeh û Hêla Hiqûqî Ya Revandina Zarokan Ya Navnetewî” hate qebûl kirin. (Qanûna bi hejmara 5717 ya bi dîroka 22/11/2007, Rojnameya Fermî: 4/12/2007, 26270)
2008
2002-2012
215
2008
· Qebûlkirina Qanûna Parastina Şahidan: Ji bo parastina şahidan yên ku di qonaxeke darizandinê de egera agahiyên wî, serî lê hatyi dayîn û nêzîkên wî, bi armanca tevdîrgirtinan alîkariya dadê bê kirin, “Qanûna Parastina Şahidan” hate qebûl kirin. Di serastkirina navborî de; ji ber peywira şahidiyê; jiyan, bitûniya beden, hebûna mal yên şahidan yan jî yên di astekî de nêzîkî wan di bin talûkeyeke mezin û giran de bin, kesên ku derheqê wan de tevdîrên parastina şahidiyê divê werin girtin, gelo ev biryarên tevdîrê di kîjan sûcan de werin girtin, mawe, guherîn, rakirina, sepandina biryarên parastina şahidan û hukmên derbarê mijarên hevkarîya navnetewî cih digirin. (Qanûna bi hejmara 5726 ya bi dîroka 27/12/2007, Rojnameya Fermî: 5/1/2008, 26747)
· Derxistina Qanûna Weqfan Ya Nû: Di rêya hêzdarkirina cîvaka sivîl de wek pêngaveke girîng “Qanûna Weqfan” ya nû hate derxistin. Li gor medeya 7. ya vê Qanûnê ve ya ku derbarê mafên milkiyetê de pakîyên girîng pêk anî, 181 malên xeyrî menqûl, piştî serlêdanan li ser navên cemaetan hatin qeyd kirin. (Qanûna bi hejmara 5737 ya bi dîroka 20/2/2008, Rojnameya Fermî: 27/2/2008, 26800)

· Di Madeya 301 Ya Qanûna Cezayê Ya Tirk De Guherîn: Ji bo hêzdarkirina azadiya îfadeyê di madeya 301 ya TCKê de guherîn hate kirin û bi vî awayî vekirina lêpirsînê ji bi destûra Wezareta Dadê ve hate girêdan ku sînora jor ya cezayê jî hate daxistin. (Qanûna bi hejmara 5759 ya bi dîroka 30/4/2008, Rojnameya Fermî: 8/5/2008, 26870)

Şoreşa Bêdeng

216

· Girtina Bin Ewlehiya Qanûnî Ya Mafê Weşanê Ya Bi Ziman û Zaravayên Cuda: Him di gelemperî him jî saziyên televîzyon û radyoyên taybet de pêkanîna derfeta weşanê ya bi ziman û zaravayên cuda yên ku welatîyên Tirkiyê di jiyana xwe ya rojane de bi awayekî kevneşopî bikar tînin gihîşt ewlehiyeke qanûnî; bi vî awayî digel televîyonên taybet li ber TRTê jî astengîyên qanûnî hatin rakirin û mafê weşanê ket bin ewlehiya qanûnî. (Qanûna bi hejmara 5767 ya bi dîroka 11/6/2008, Rojnameya Fermî: 26/6/22008, 26918)

· Hêzdarkirina Rêvebirinên Herêmî: Ji bo hêzdarkirina xweserîtî û binesaziyên aborî yên rêvebirîyên herêmî “Qanûna Derheqê Ji Rêvebirinên Taybet Yên Bajêr û Şaredariyan Re Ji Hatiniyên Bacê Yên Budçeya Gîştî Par Dayîn” hate qebûlkirin û kete merîyetê. (Qanûna bi hejmara 5779 ya bi dîroka 2/7/2008, Rojnameya Fermî: 15/7/2008, 26937)

· Erêkirina Peymana Astengdaran Ya Neteweyên Yekbûyî: “Peymana Derbarê Mafên Astengdaran Ya Neteweyên Yekbûyî” ya ku ji dewletên alîgir re berpirsyariyên li hember astengdaran û rakirina hemû cure cudakarî û bilindkirina standarên jiyana astegdaran tîne, hate erê kirin. (Qanûna bi hejmara 5825 ya bi

dîroka 3/12/2008, Rojnameya Fermî: 18/12/2008, 27084)
· Sazkirina Komîteya Şopandina Mafên Zarokan: Ji bo gihandina binesaziya sazîtîya xebatên derbarê mafên zarokan yên di bin banê TBMMê de têne kirin, «Komîteya Şopandina Mafên Zarokan» ya hemû nûnerên komên partiyên siyasî tê de cih digirin hate sazkirin.
2009
2002-2012
219
2009
· Di Ziman Û Zaravayên Cuda De Anîna Derfeta Reklamê: Bi guherîna ku di Rêziknameya Reklamê Ya Saziya TelevîzyonRadyo Ya Tirkiyeyê de hate kirin ve di qanalên bi zimanên cuda weşanê dikin de, li ser zimanê ku weşan tê kirin reklam jî were kirin hate mimkun kirin. (Rojnameya Fermî: 31/1/2009, 27127)
· Qebûlkirina Qanûna Komîsyona Wekheviya Fersenda Jin û Mêran: Ji bo parastin û pêşvebirina mafên jinan, pêkanîna wekheviya jin û mêran, li welatê me û qada navnetewî pêşketinên di vî warî de were şopandin, di vî warî de agahdarkirina TBMMyê, wek komîsyona esas û talî karên ku hawaleyê wê hatiye kirin gotûbêj bike, dema xwestinê derheqê biryarnameyên di hukmê qanûnê de, pêşniyar û pêşnûmayên qanûnê yên ku ji TBMMê re hatine pêşwazî kirin de ji komîsyonên pîsporî re ramanên xwe parve bike “Qanûna Komîsyona Wekheviya Fersenda Jin û Mêran” hate qebûl kirin. (Qanûna bi hejmara 5840 ya bi dîroka 25/2/2009, Rojnameya Fermî: 24/3/2009, 27179)
· 1ê Gulanê Wek Roja Pişteyanî û Kedê Hate Qebûl Kirin: Bi Qanûna Guherîn Kirina Di Qanûna Derheqê Betlaneyên Giştî û

Cejnên Netewî De, roja 1ê Gulanê wek betlaneya «Roja Pişteva nî û Kedê» di nav betlaneyên giştî û cejnên netewî de cih girt. (Qanûna bi hejmara 5892 ya bi dîroka 22/4/2009, Rojnameya Fermî: 227/4/2009, 27212)

Şoreşa Bêdeng

220

· Derxistina Qanûna Welatîtbûnê Ya Nû: Bi derxistina Qanûna Welatîtiyeke Nû ve Qanûna Welatîtîyê ya bi hejmara 403 hate pûç kirin, bi hinceta ku ji ber kirinên li gor girêdayîna bi welatê ne lê ne, pêkanîne û bi vî awayî mafê welatîbûna Tirkiyê winda kirine, ji Lijneya Wezîran re derfet hate dayîn ku bikaribe jinûve mafê welatîtbûnê bide van kesan. Bi vê Qanûnê re ji rê hate vekirin ku kesên di heyama derbeya eskerî ya 12ê Îlonê de yan jî piştî vê ji ber sedemên siyasî mecbûr mane ku derkevin derve û mafên welatîbûnê ji dest wan hatine girtin bigihîjin mafên xwe. (Qanûna bi hejmara 5901 ya bi dîroka 29/5/2009, Rojnameya Fermî: 12/6/2009, 27256)

· Sivikirina Kirdariyên Bîrokratîk: Ji bo pêkanîna rêvebirineke gelemperîyê ya bi bandor, sûdewar, hesab dide, baweriya xwe beyana welatîyan tîne û xizmetên gelemperîyê bilez, bi qelîte, sivikirî û melîyet kêm werin kirin esas û ûsilên divê îdare li gorî wê tevbirgerin jinûve hatin serastkirin. Di vê çarçoveyê de, li ser tevahîya 170 rêziknameyên Serokwezîrtîyê, Wezîrtîyan û hin saziyên girêdan û têkîldar guherîn hatin kirin. (Rêziknameya Derbarê Esas û Ûsilên Sepandina Pêşwazîkirina Xizmetên Gelemperîyê û Xebatên Yekirina Kirdariyên Kêmkirina Bîrokrasiyê, Rojnameya Fermî: 31/7/2009, 27305)

· Ji Bo Girtî û Hikumxwar Li Girtîgehê Bi Xizm û Eqrebayên Xwe

Re Bi Zimanên Xwe Yê Zikmakî Hevdîtinan Pêk Bînin Derfet
Hate Dayîn: Bi «Destûrnameya Derbarê Guherîn Kirina Li Ser Destûrnameya Derheqê Înfaza Tevdîrên Ewlehiyê û Cezayê û Ceza û Rêvebirinên Saziyên Înfaza Cezayê» destûr hate dayîn ku bi beyan kirina hukimxwaran, heke bi xwe an jî kesên ku dê hevdîtinê pêk bîne, zimanê Tirkî nizanibin, bi telefonê, bilî zimanên Tirkî jî axaftinê pêk bîne. Piştre bi derxistina Rêziknameyê jî rêya ku girtî û hukimxwar digel zîyaretvanên xwe ji bilî zimanê Tirkî jî rûbirû hevdîtina pêk bîne hate vekirin. (Rêziknameya Derbarê Guherîn Kirina Li Ser Rêziknameya Derheqê Ziyaretkirina Girtî û Hukimxwaran, Rojnameya Fermî: 6/11/2009, 27398)
2002-2012
221
· Ji Saziyên Radyo û Televîzyonên Taybet Re Dayîna Derfeta Bi Zimanên Cuda 24 Seetî Weşan Kirinê: Bi hukmên « Reziknameya Derheqê Weşana Televîzyon û Radyoyê Ya Bi Ziman û Zaravayên Cuda Ya Welatiyên Tirk Di Jiyana Xwe Ya Rojane De Bi Awayekî Kevneşopî Bi Kar Tînîn» ya ku ji aliyê Lijneya Jorîn Ya Radyo û Televîzyonê ve hate amadekirin re derfet hate dayîn ku saziyên radyo û televîzyonên taybet jî karibin bi ziman û zaravayên cuda 24 seetî weşanê bikin. (Rojnameya Fermî: 13/11/2009, 27405)
· Derfetdayîna Di Zanîngehên Me De Derbarê Ziman û Zaravayên Cuda Lêkolîn Kirin, Sazkirina Enstûtiyê û Danîna Dersa Bijarte: Derfet hate dayîn ku derbarê ziman û zaravayên ku welatîyên me di jiyana xwe ya rojane de bi awayekî kevneşopî bikar tînin di zanîngehên me de lêkolîn werin kirin, enstûtî bên sazkirin û bi rengekî bijarte ders werin dayîn. Di vê pêgehê de;

«Biryara Derbarê Sazkirina Enstûtiya Zimanên Li Tirkiyeyê Dijîn ya girêdayî Rektoriya Zanîngeha Artuklu Ya Mêrdînê» ya di dîroka 12/10/2009ê de di Civîna Wezîran De hate girtin re, di bin banê Zanîngeha Artukluyê «Enstûtiya Zimanên Li Tirkiyê Dijîn» ya ku bi şaxên makezanîstî ya «Çand û Zimanê Kurdî», «Çand û Zimanê Sûryanî» «Çand û Zimanê Erebî» pêk tên hate sazkirin. Li Enstîtûyê bi zimanên Kurdî, Erebî û Sûryanî perwerdehiya lîsansa bilind tê dayîn. (Rojnameya Fermî: 1/12/2009, 27419)

· Destekdayîna Feelîyetên Çandî Yên Bi Zimanên Cuda: Ji aliyê Lijneya Destekdayîna Sînemayê Ya Wezareta Turîzm û Çandê cara ewil ji fîlma (Du Ziman û Baholek - İki Dil Bir Bavul) ku tê de bi awayekî zêde axaftinên Kurdî derbas dibûn wekî madî hate destek kirin. Ji aliyê Midûriyeta Giştî Ya Şanoyên Dewletê ve li hin bajaran lîstikên şanoyê yên bi zimanê Kurdî hatin nîşan dan. Qanala TRT 6 ya ku bi zimanê Kurdî weşanê dike, di rojên olî de dest bi weşandina bernameya mewlûda Kurdî kir.

Şoreşa Bêdeng

222

· Navendên Bangewaziyê: Di navenda hawarê ya ku ji aliyê Walîtiya Dîyarbekirê ve hate vekirin de ji bo ku bi welatîyên ku Tirkî nizanin re jî rabigihin personelên Kûrdî û Zazakî zanin hatin peywirdar kirin.

2010

2002-2012

225

2010

· Kêmkirina Xalên Lêgerîn û Kontrola Rê: Ji bo hêsankirina

jiyana rojane ya welatîyên me, bi hejmara xalên lêgerîn û kontrola rê hatin kêmkirin. (Giştînameya «Xalên Lêgerîn û Kontrola Rê» ya bi hejmara 2010/4 ya bi dîroka 15/1/2010 ya Wezareta Karên Navxweyî)

· Jinûve Vekirina Bikaranîna Mêrg û Zozanan: Ji bo bilindkirina asta refah û îstîhdamkirina welatîyên me qedexeyên derbarê mêrg û zozanan yên bi taybetî li Rojhilat û Başûrêrohilatê Anatoliyayê hatin rakirin. (Giştînameya «Mêrg û Zozanan» ya bi hejmara 2010/5 ya bi dîroka 15/1/2010 ya Wezareta Karên Navxweyî)

· Lêvegerîna Navên Berê Yên Cih û Deveran: Rê ji bo dayîna navên berê ji cih û deveran re hate vekirin ; di vê çarçoveyê de li ser navên hin cih û deveran guherîn hatin kirin.

· Rakirina Protokola EMASYAyê: Ji bo nîşandana nêrîna cuda ya ewlehiyê û bicihkirina dewleta hiqûqê «Protokola Derbarê Tevdîrên Hevkar Divê Bên Girtin Yên Li Gor Madeya 11/D Ya Qanûna Rêvebirinên Bajêr Ya bi hejmara 5442 ya di Navbera Wezareta Karên Navxweyî û Serokatiya Sererkaniyê de» ya ku bi navê Protokola EMASYAyê tê nasîn, Protokola bi dîroka 4/7/2010an ve ji merîyetê hate rakirin. Serastkirina Protokola EMASYAyê ya ku ne li gor prensîbên dewleta hiqûqê bû û li ber destwerdanên der demokrasîyê hêsan dikir ji merîyetê

hata rakirin û bi vî awayî rêvebirina sivîl û dewleta hiqûqê ya demokratîk hate hêzdar kirin.

· Di Mijara Mafên Mirovan Ya Zarokên Keç û Jinan De Weşandina Giştînameyê: Ji bo firehkirina sepandinên pêşxistin

û parastina mafên mirovan yên zarokên keçik in û jinan ji aliyê Wezareta Navxweyî ve giştînameyek hate weşandin. (Giştînameya bi hejmara 2010/10 ya bi dîroka 19/02/2010)

· Zêdekirina Zelalbûnê û Hêzdarkirina Têkoşîna Li Dijî Bêrêtiyê: Wek nîşandana biryardariya têkoşîna li dijî bêrêtiyê ya welatê me û bi rakirina faktorên ku bêretiyê xwarindar dikin û zelalbûnê asteng dikin û bi vî awayî pêkanîna nêrîna rêvebirineke ewle, zelal, hesab dide û dadmend «Stratejîya Hêzdarkirina Têkoşîna Li Dijî Bêrêtiyê û Zêdekirina Zelalbûnê» ji aliyê Lijneya Wezaretê ve hate qebûl kirin. Plana Çalakî ya derbarê stratejîya navborî jî ji aliyê «Komîsyona Li Tirkiyê Hêzdarkirina Têkoşîna Li Dijî Bêrêtiyê û Zêdekirina Zelalbûnê» ve di dîroka 12/4/2010an de hate erê kirin. (Biryara Lijneya Wezîran ya bi hejmara 2010/56 ya bi dîroka 1/2/2010, Rojnameya Fermî: 22/2/2010, 27501)

· Sazkirina Lijneya Kordînasyona Têkoşîna Li Dijî Koçên Der Qanûnî: Ji bo şopandina sepandinên biryarên hatine girtin, girtina tevdîrên nû û teqîbkirina tevdîrên ku têkoşîna li dijî koçên der qanûnî hatine girtin, di bin banê Wezareta Navxweyî de «Lijneya Kordînasyona Têkoşîna Li Dijî Koçên Der Qanûnî» hate sazkirin. (Erêkirinên bi dîroka 24/2/2010 ya Meqamên Wezareta Navxweyî)

· Sazkirina Misteşariya Ewlehî û Pergala Gel: Bi Qanûna bi hejmara 5952 ya bi dîroka 17/2/2010an ve, di qada têkoşîna li dijî terorê de wek hewcehiya nêrîneke piralî bikaranîna rêbazên zanîstî û daneyan hêj zêde kirina analîzan, dayîna pêşniyarên çareseriyê, pêşxistina stratejî û polîtikayan û di vê mijarê de 2002-2012

pêkanîna kordînasyonê ya di navbera sazî û dezgehên têkîldar de «Misteşariya Ewlehî û Pergala Gel» hate sazkirin. (Rojnameya Fermî: 4/3/2010, 27511)16

· Pêkanîna Bi Ziman û Zaravayên Cuda Kirina Propogandaya Siyasî: Qada hiqûqa partiyên siyasî hate firehkirin, wek hewcehiya azadiya rêxistinbûn û îfadeyê astengîyên qanûnî yên li ber propandayên siyasî hatin rakirin. Bi vê kirinê re, partiyên siyasî êdî dikarin di xebatên xwe yên siyasî de bi ziman û zarayên cuda yên ku welatîyên me bi kar tînîn bangî gel bikin. (Qanûna bi hejmara 5980 ya bi dîroka 8/4/2010, Rojnameya Fermî: 10/4/2010, 27548)

· Teşwîqkirina Civaka Sivîl: Ji bo teşwîqkirina civaka sivîl di dîroka 30/4/2010an de «Telîmatnameya Derheqê Alîkarî Dayîna Komeleyan Ji Budçeya Wezareta Karên Navxweyî» kete merîyetê û li gor vê bi pereyê terxankirî di nav budçeya Wazereta Karên Navxweyî de cih girt ku hate destpê kirin û derfet çêbû ji komeleyan re li hember projeyê desteka hîbeyê were dayîn.

· Parastina Welatiyên Girêdayî Baweriyên Cuda: Ji bo teşwîqkirina welatîyên girêdayî bawerîyên cuda bên parastin û rêzê bibînin giştînameyeke Serokwezîrtîyê hate derxistin. Bi vê giştînameyêr hate destnîşankirin ku welatîyên xwediyê baweriyên cuda wekî veneqetî parçeyên Tirkiyê ne û ji hemû saziyên dewletê re hate bi bîrxistin ku li gor qanûnan li ber van welatîyan tevbigerin, di kirdarî û karên wan yên saziyên dewletê de dijwarî neyên derxistîn û di heqê wan de kêmasî çênebin.

16 Ji aliyê Misteşariya me ve, bi navê «Têkoşîna Li Dijî Terorê û Mafên Mirovan» ji

bo di têkoşîna li dijî terorê pêkanîna dengeya azadiyê û ewlehiyê «Tekstên Jêder
û Prensibên Derheqê Têkoşîna Li Dijî Terorê De û Mafên Mirovan» ya Konseya
Ewropayê ya ku di qada navnetewî de belgeyeke referans e wek kitêbeke bi zimanê
Tirkî û Îngîlîzî, wek weşana ewil ya Misteşariya me hate çapkirin û di nav de saziyên
ewlehiyê jî ji dezgeyên têkîldar re hate belavkirin.

· Ji Bo Pêkanîna Wekheviya Fersende û Zêdekirina Îstîhdama Jinan Sazkirina Lijneya Jorîn Ya Îstîhdama Jinan: Bi Giştînameya Serokwezîrtîyê ve, ji bo zêdekirina îstîhdama jinan û di jiyana kar û civakê de pêkanîna wekheviya jin û mêran, hêzdarkirina asta aborî û civakî ya jinan, «Lijneya Jorîn Ya Îstîhdama Jinan» hate avakirin. Lijneya Jorîn ya navborî, bi peywirên tesbîtkirina pirsgirêkên heyî yên di qada îstîhdamkirina jinan de û ji bo safîkirina van pirsgirêkan şopandina xebatan, nirxandinan, kordînasyon kirin û pêkanîna tevkariyê hate peywîrdar kirin. (Giştînameya bi hejmara 2010/14, Rojnameya Fermî: 25/5/2010, 27591)

· Pêkanîna Hemû Zarokên Ji 18 Salî Biçûktir Li Dadgehên Zarokan Werin Darizandin: Bi «Qanûna Derbarê Guherîn Kirina Hin Qanûnan û Qanûna Têkoşîna Li Dijî Terorê» re, zarokên ku di raya giştî de wek «zarokên keviravêj» dihatin naskirin û piraniya wan ji 18 salî biçûktir bûn û tevî sûcan hatibûn kirin, di pêgeha Qanûna Têkoşîna Li Dijî Terorê de bi

hukmê ve hate girêdan ku ne di Dadgehên Cezaya Giran Ya Bi Rayeya Taybet de di Dadgehên Zarokan de werin darizandin. (Qanûna bi hejmara 6008 ya bi dîroka 22/7/2010, Rojnameya Fermî: 25/7/2010, 27652)

· Firehkirina Mafên Perwerdehiya Komên Bawerîyên Cuda: Ji bo pêşxistina mafê perwerdehiya welatîyên me yên xwediyê bawerîyên cuda ne, ji aliyê Wezareta Perwerdehiya Neteweyî pirtûkên bi zimanê Ermenkî hatin amadekirin û ji sala Hîndekarîya 2010-2011ê pê ve di dibistanên Ermeniyan de wek bê père hatin belavkirin.

· Ji Aliyê Wezareta Turîzm û Çandê Ve Destpêkirina Weşana Pirtûkên Girîng Yên Bi Zimanê Kurdî: Ji aliyê Wezareta Turîzm û Çandê ve, di dîroka 1ê Berfanbara 2010an de "Mem û Zîn" hate weşandin, wek vê hin pirtûkên girîng yên edebiyata zimanê Kurdî bi awayekî werger, heman çap û telîfên nû dest bi weşanê hatin kirin.

· Qebûlkirina Qanûna Dadgeha Dageriyê Ya Nû: Li gor nêrîna rêvebirina navend girtina welatîyan ya binesaziya sazîtîya dewletê û fonskiyonên dewletê jinûve serastkirin, cihê Qanûna Dadgeha Dageriyê ya bi hejmara 832 ya bi dîroka 1967an "Qanûna Dadgeha Dageriyê" ya nû girt û hate qebûl kirin. Bi vê Qanûnê ku hate saz kirin, kar kirin, ûsilên vênêrîn û darizandinê; tayîn kirin, wesf, spartek, raye, maf, berpirsyarî û karên din yên xwebûnê yên kesên mensûb sererast dikir, Dadgeha Dageriyeke li gor standardên vênêrîna navnetewî, tevkarîyê bide pêşxistina demokrasîya me û bendewariyên cîvaka me bîne cih ji venêrînkirina belgeyan zêdetir naverokê pêş bixe, ji derfetên

teknolojîyê sûde werdigire û ji karên darazê re jî xebatkarîyê pêk tîne were sazkirin. (Qanûna bi hejmara 6085 ya bi dîroka 3/12/2010, Rojnameya Fermî: 19/12/2010, 27790)

· Sazkirina Beşên Wêje û Zimanê Kurdî: Li gor biryara ku di civîna lijneya giştî ya bi dîroka 23/12/2010an ya Lijneya Hîndekarîya Bilind (YÖK) de hate girtin, li Tirkiyê cara ewil di bin banê Zankoya Wêje û Fen ya Zanîngeha Alparslan ya Mûşê de di asta bernameya lîsansa çar salî de «Beşa Wêje û Zimanê Kurdî» hate sazkirin.

GUHERÎNÊN MAKEZAGONÊ YÊN DI DÎROKA 12 ÎLONA 2010AN DE HATIN KIRIN 17

· Cudakariya Pozîtîf: Ji bo jin, zarok, pîr, astengdar, gazî, malûl, sêwî û jinebiyên şehîdên wezîfeyê û herbê wek beşên sepandina cudakariya pozîtîf werin kirin, hatin dîyar kirin. (Makezagon Made 10)

· Firehkirina Azadiya Seyahetê: Li ser pêgeha firehkirina azadiya seyahatê, pêgeha qedexeya derketina derveyî welat hate teng kirin. (Makezagon Made 23)

17 Qanûna bi hejmara 5982 ya bi dîroka 7/5/2010 (Rojnameya Fermî: 13/5/2010,
27580)

Şoreşa Bêdeng
230

· Mafên Zarokan: Prensîbên bingehîn yên navnetewî yên derbarê mafên zarokan, ketin ewlehiya makezagonê. (Makezagon Made 41)

· Hêzdarkirina Mafên Sendîkatiyê: Di vê çarçovêyê de ji peywîrdarên gelemperîyê re derfeta peymana komî hate dayîn, di vê mijarê de qanûna sepandinê ya bi hejmara 6289

ya “ Qanûna Derbarê Guherîn Kirina Di Qanûna Sendîkayên Peywirdarên Gelemperîyê De” kete merîyetê. (Makezagon Made 53 Rojnameya Fermî: 11/4/2012, 28261)

· Venêrîna Gelemperîyê: Saziya Venêrîna Gelemperîyê, kete bin palpişta makezagonê. (Makezagon Made 74)

· Rakirina Ketina Mafê Parlamenteriyê Ya Ji Ber Girtina Partiyên Siyasî: Hukma derbarê ketina mafê parlamenteriyê ya ku piştî girtina partiyên siyasî derdiket holê ji merîyetê hate rakirin. (Makezagon Made 84)

· Guherîna Bi Hejmara Têr Ya Biryara Derbarê Tengavkirinên Darayî û Girtina Partiyên Siyasî: Ji bo girtina partiyên siyasî û tengavkirinên din yên darayî di Makezagonê de şerta ji sisê zêdetir didu hate dayîn. (Makezagon Made 149)

· Biryarên Şûraya Eskerî Ya Bilind (YAŞ): Ji kesên ku bi biryarên YAŞê ji arteşê hatine dûr xistin re, rêya darazê hate vekirin. (Makezagon Made 125)

· Reyaya Darazê Ya Dadgehên Eskerî: Sepandina ku sivîl di dadgehên eskerî de dihatin darizandin hate dawî kirin. Hate pêkanîn ku esker ji bilî sûcên eskerî di dadgehên sivîl de werin darizandin. (Makezagon Made 145)

· Demokratîkirina Binesaziya HSYKê: Lijneya Bilind Ya Dozger û Dadgeran (HSYK) gihîşt binesaziyeke demokratîktir. Di vê çarçoveyê de qanûna sepandinê “ Qanûna Lijneya Bilind Ya Dozger û Dadgeran” kete merîyetê. (Qanûna bi hejmara 6087 ya 2002-2012

231

bi dîroka 11/12/2010, Rojnameya Fermî 18/12/2010) Ji aliyê din biryarên HSYKê yên ku dozger û dadger ji pîşeyê derdixistin ji

venêrîna darazê re hatin vekirin. (Makezagon Made 159)
· Firehkirina Mafên Serîlêdana Darazê Ya Karmendên Dewletê: Li hember ji cezayên şermezar û hişyar kirinê yên ku ji karmendên dewletê re dihat dayîn rêya darazê hate vekirin. (Qanûna bi hejmara 5982, guherîna bi made 13. ve di madeya 129/3 ya Makezagonê hate kirin.)
· Demokratîkirina Binesaziya Dadgeha Makezagonê: Binesaziya endamê Dadgeha Makezagona bingehîn, gihîşt binesaziyeke hêj demokratîk û piranîparêz, maweya xebata endaman bi 12 salan ve hat sînor kirin. (Makezagon Made 146)
· Firehkirina Rayeya Darizandinê Ya Bi Sifeta Dîwana Berz Ya Dadgeha Qanûna Bingehîn: Ji Dadgeha Makezagonê re raye hate dayîn ku bi sifeta Dîwana Berz, Serokê Meclîsa Gel Ya Mezin Ya Tirkiyê (TBMM), Serokê Sererkaniyê û Fermandarên Qewetê darizîne. (Makezagon Made 148)
· Ji Serxwebûna Daraza Eskerî Girtina Bin Ewlehiyê (Makezagon Made 145)
· Ji Darbekarên 12 Îlonê Re Vekirina Rêya Darazê (Bi merîyetê rakirina madeya 15. ya Demkî ya Qanûna Bingehîn)
· Mafdayîna Serîlêdana Şexsî Ya Ji Dadgeha Makezagonê Re: Ji bo pêkanîna “dewleteke hiqûqê” ya li hember mafên mirovan rêzê digire, wek rêyeke nû ya hiqûqê maf hate dayîn ku ji Dadgeha Makezagonê re serîlêdana şexsî jî were kirin. (Makezagon Made 148)
· Gihandina Ewlehiya Makezagonî Ya Parastina Daneyên Şexsî: Li madeya 20. ya Makezagonê ev îfade hate lê kirin: “Hemû kes dikare xwediyê mafê daxwaza ku parastina daneyên şexsî yên Şoreşa Bêdeng

232
xwe bike. Ev maf, derheqê daneyên şexsî yên derbarê xwe de agahdarkirin, gihîştina van daneyan, daxwazkirina serastkirinê yan jî jêbirina wan daneyan, hînbûna li gor armancê hatiye bikaranîn yan jî na, dihewîne. Daneyên şexsî, bitenê li gor rewşên qanûnê hatin pêşbînî kirin yan jî razîbûneke vekirî ya kesê têkîldar tê vehûnandin. Ûsil û esasên parastina daneyên şexsî bi qanûnê ve hatin sererast kirin. (Makezagon Made 20)
· Di Makezagonê De Cihgirtina Konseya Civakî û Aborî:
Konseya Civakî û Aborî ya ku di sala 2001ê de hate sazkirin, gihîşt ewlehiya qanûna bingehîn û wek çalak kete merîyetê. (Makezagon Made 166)
2011
2002-2012
235
2011
· Ji Qanûna Derheqê Seyahat û Îkameta Li Tirkiyê Ya Biyaniyan
Derxistina Hukmên Cudakarî: Di «Qanûna Derheqê Seyahat û Îkameta Li Tirkiyê Ya Biyaniyan» de guherîn hate kirin û gotina «çîngene» ya ku dihat wateya cudakariyê ji tekstê hate derxistin. (Guherînên bi Qanûna bi hejmara 6097 ya bi dîroka 5/1/2011ê hate kirin ve, Rojnameya Fermî: 19/1/2011, 27820)
· Ketina Merîyetê Ya Peymana AK Ya Ji Bo Rêlibergirtina Terorîzmê:18 Erêkirina «Peymana Libergirtina Terorîzmê Ya Konseya Ewropayê» ya ku ji aliyê Tirkiyeyê ve di dîroka 19/1/2006an de hate îmze kirin ku di dîroka 16/5/2005an de li Varşovayê ji îmzekirinê re hatibû vekirin, di cih de hate dîtin. Li gor Tirkiyeyê Peymana navborî ji dîroka 1/7/2012an pê ve

kete merîyetê. (Qanûna bi hejmara 6135 ya bi dîroka 23/2/2011, Rojnameya Fermî: 12/3/2011, 27872)

· Erêkirina Protokola Îxtiyarî Ya Pêvek Ya Ji Peymana Neteweyên Yekbûyî Ya Li Hember Ceza An Jî Kirdariya Biçûkxistî An Jî Dermirovahî, Zalimtiyên Din û Îşkenceyê Re: Tirkiye, di çarçoveya "polîtikaya sifir tolerans ya li hember îşkenceyê "Protokola Îxtiyarî Ya Pêvek Ya Ji Peymana Neteweyên Yekbûyî Ya Li Hember Ceza An Jî Kirdariya Biçûkxistî An Jî Dermirovahî, Zalîmtiyên Din û Îşkenceyê Re" erê kir. Bi 18 Di vê çarçoveyê de Peymana navborî ya ku hat nirxandin dê tevkariyê bide daneheva agahiya heyî ya têkoşîna li dijî terorê, bi awayekî hirgulî hat danasîn û wek weşana Misteşariyê bi navê, «Peymana Ewropayê Ya Li Ber Girtina Terorîzmê Ya Bi Hemû Biûdan Ve» hat çapkirin û ji hemû saziyên têkîldar re hat belavkirin.

vê protokola navborî re, ji bo libergirtina ceza û kirdariyên biçûkxistinê û dermirovahî, zalîmtiyên din û îşkenceyê pergala ku rê dida ji navendên binçavkirinê re dezgehên navnetewî û netewî serdanê bikin hate saz kirin. Tirkiyê bi alîgirbûna Protokolê ve, stûbariya "Komîteya Jêrîn Ya Li Ber Girtina Îşkenceyê" ziyareta navendên binçavkirinê, nezaretxaneyan, qereqolan bike, pejirand. (Qanûna bi hejmara 6167 ya bi dîroka 23/2/2011, Rojnameya Fermî: 12/3/2011, 27872)

· Pêşîgirtina Tecîza (Mobbing) Psîkolojîk Ya Li Kargehan: Ji

bo ku tevdîr bê girtin ku xebatkar li kargehan tecîza (mobbing) psîkolojîk werin parastin, di mijara ku li kargehan li ber girtina tecîza psîkolojîk de Giştînameya Serokwezîrtyê hatê weşandin. Bi vê Giştînameyê re hate armanckirin ku li ber tecîza psîkolojîk xebatkar bi qestî û pergaltî bi demeke dîyarî neyê bêrûmetkirin, biçûkxistin, vederkirin, rêzdarî û şexsîyeta wî neyê zedekirin, rastî kirdariya xirab neyê, neyê bezandin û wek wisa û hate pêşbînî kirin ku him ewlehî û sihetiya kar him jî aştiya xebatê pêk were. (Giştînameya bi hejmara 2011/2, Rojnameya Fermî: 19/3/2011, 27879)

· Ketina Merîyetê Ya Rêya Serîlêdana Şexsî: Ji Ahengsaziya guherîna Makezagonê, “Qanûna Derheqê Ûsilên Darizandin û Sazkirina Dadgeha Makezagonê” hate qebûl kirin. Li gor Qanûnê, Dadgeha Makezagonê ji dîroka 23/9/2012an pê ve, dest bi qebûlkirina serîlêdanên şexsî kir. Di vê pêgehê de ji dîroka berfanbara sala 2012an pê ve ji Dadgeha Makezagonê 1.615 sêrîlêdanên şexsî hatin kirin. (Qanûna bi hejmara 6216 ya bi dîroka 30/3/2011, Rojnameya Fermî: 3/4/2011, 27894)

· Ji Bo Çalakirina Xizmetên Darazê Serarest Kirin: Ji bo, sivikirina barê karê dezgehên daraza bilind û kêmkirina bi hejmara lihevnekirinên ku diçin pêşberî dadgehê, veguherîna qebehetê yên hin sûcan û çalakirina dezgehên daraza bilind “Qanûna Derbarê Guherîn Kirina Di Hin Qanûna De Ji Bo

Lezandina Xizmetên Darazê” hate qebûl kirin. (Qanûna bi hejmara 6217 ya bi dîroka 31/3/2011, Rojnameya Fermî: 14/4/2011, 27905)

· Qebûlkirina Qanûna Derbarê Libergirtina Bê Pergalî û Şîdetê Ya Di Sporê De: Ji bo di sporê de rê li ber şîdet, nîjatperestî û cudakarîyê were girtin “Qanûna Derbarê Pêşîgirtina Bê Pergalî û Şîdetê Ya Di Sporê De” hate qebûl kirin. (Qanûna bi hejmara 6222 ya bi dîroka 31/3/2011, Rojnemya Fermî: 14/4/2011, 27905)
· Di Zanîngehên Me De Sazkirina Şaxên Makezanîstî û Enstîtûyên Derbarê Zarava û Zimanên Cuda: Ji bo li ser zarava û zimanên ku welatîyên me di jiyana xwe ya rojane de bi kar tînîn, lêkolînên akademîk bên kirin di bin bane Zanîngeha Bîngolê de «Esntîtûya Zimanên Zindî» hate sazkirin. (Rojnameya Fermî: 03/07/2011, 27983) Ji aliyê din ve, bi erêkirina Lijneya Hîndekariya Bilind ve (YÖK) di Berfanbara sala 2011ê de di bin bane Beşa Wêje û Zimanên Rojhilat Ya Zankoya Wêjeyê Ya Zanîngeha Tunceliyê de şaxên zanîstiya sereke ya «Wêje û Zimanê Zazakî», “Wêje û Zimanê Kurmancî» û «Wêje û Zimanê Erebî» hatin saz kirin.
· Di Bin Banê Wezareta Dadê De Sazkirina Serokatiya Daîreya Mafên Mirovan: Bi «Biryarnameya Di Hukma Qanûnê De Ya Derbarê Guherîn Kirina Hin Biryarnameyên Di Hukma Qanûnê De û Qanûna Derheqê Qebûlkirina Guherîna Biryarnameya Di Hukma Qanûnê De Ya Derheqê Peywîr û Teşkîlata Wezareta Dadê» re û ji bo şopandina çalaktirbûna dozên ku di AHİMê de têne dîtin, di bin banê Wezareta Dadê de «Serokatîya Daîreya Mafên Mirovan» hate sazkirin. (Biryarnameya Di Hukma Qanûnê de (KHK) ya bi hejmara 650, Rojnameya Fermî: 26/8/2011, 28037)
· Ji Peymana AKê Re Ya Di Mijara Parastina Li Hember Îstîsmarkirin û Mêtîna Zayendî Ya Zarokan De Terefbûyîn:

Şoreşa Bêdeng
238
«Peymana Parastina Li Hember Îstîsmarkirin û Mêtîna Zayendî Ya Zarokan Ya Konseya Ewropayê» di dîroka 25/10/2007an de hate îmze kirin û kirdariyên êrêkirinê jî di dîroka 1/4/2012an de hatin qedandin û Peyman kete merîyetê. (Rojnameya Fermî: 10/9/2011, 28050)
· Di Bin Banê Meclîsa Gel Ya Mezin Ya Tirkiyeyê (TBMM) de Sazkirina Komîsyonên Lêkolînê: Bi taybetî ji bo ku pirsgirekên têkoşîna li dijî terorê yên di heyama rewşa awarte û rêvebirina awarte de pêk tên werin lêkolandin di dîroka 13/10/2011ê de di bin banê Mafên Mirovan ya TBMMê de «Komîsyona Jêrîn Ya Lêkolandina Binpêkirinên Mafên Jiyanê Yên Di Pêgaha Bûyerên Şîdet û Terorê De» hate sazkirin.
· Derbarê Tiştên Li Girtîgeha Dîyarbekirê Hatin Jiyîn Lêpirsîn: Serdozgeriya Komara Dîyarbekirê, derbarê tiştên di Girtigeha Dîyarbekirê de hatin jiyîn de ku gelek binpêkirinên mafên mirovan pêk hatibûn lêpirsîn vekir.
· Cara Ewil Di Kataloga TBMMyê De Cihgirtina Zimanê Kurdî: Di kataloga ku ji bo nasandina endamên heyama 24. ya TBMMyê de cara ewil li cem zimanên din, zanebûna zimanê «Kurdî» yên wekîlan jî cih girt.
· Guhertina Navê Qişlaya Mustafa Muğlalı: Navê Qişlaya General Mustafa Muğlalı ya li Wanê, hate guhertin.
· Selihandina Perestxaneyên Ku Ji Aliyê Welatiyên Xwedî Komên Bawerîyên Cuda Ve Têne Bikaranîn: Di pêgeha azadiya perestgehê de, li cem lêvegerana xeyrî menqûlên weqfên cemaetan, selihandina perestxaneyên ku ji aliyê welatîyên

xwedî komên bawerîyên cuda ve têne bikaranîn dewam kir. Di vê mînwalê de li Dîyarbekirê Dêra Surp Gîragos ya ku xebata selihandina wê temam bû, di Cotmeha sala 2011ê de ji bo perestgehê hate vekirin. Dêra Meryam Ana ya Kumkapıyê û Dêra Vorodman a Vortvoks ya aîdî Weqfa Mektebî piştî qedandina
2002-2012
239
xebatên selihandinê di Berfanbara sala 2011ê de bi merasîmê ve ji bo perestgehê hatin vekirin.
· Hêsankirina Bikaranîna Azadiya Perestgehê: Ji aliyê Wezareta Tûrîzm û Çandê ve destûr hate dayîn ku di Keşîşxaneya Sümela ya Trabzonê û Dêra Akdamar ya Wanê de perestgeh were kirin.
2012
2002-2012
243
2012
· Ji Mufredatê Derxistina Dersa Agahiya Ewlehiya Netewî: «Rêziknameya Hîndekariya Agahiya Ewlehiya Neteweyî» ji merîyetê hate rakirin. Bi vî awayî, dersa «agahiya ewlehiya neteweyî» ya ku ji aliyê peywirdarên esker ve dihat dayîn, ya ku 33 sal bû di mufredata hîndekarîhîndekariya navîn de cih digirt, ji sala hîndekarî û perwerdehiya 2012-2013an pê ve ji mufredatê hate derxistin. (Rojnameya Fermî: 25/1/2012, 28184)
· Qebûlkirina Qanûna Hilbijartina Serokomar: Ji bo Ahengsaziya guherîna Makezagonî ya derbarê hilbijartina serokomar, «Qanûna Hilbijartina Serokomar» ya ku esas û ûsilên derbarê kirdariyên roja hilbijartin û piştî hilbijartinê werin kirin, wesfên ku li ser endamên serokomar werin lêgerîn û hilbijartina

Serokomariyê serast dikir, hate qebûl kirin. (Qanûna bi hejmara 6271 ya bi dîroka 19/1/2012, Rojnameya Fermî: 26/1/2012, 28185)

· Ji Rojnameyên Hindikeyan Re Derfetdayîna Weşandina Reklamên Fermî: Di çarçoveya Biryara Lijneya Giştî Ya Saziya Îlana Çapemeniyê de; li gor Girêbesta Lozanê ji rojnameyên hindikahiyên ku hatine dîyar kirin re, pêkan bû ku bi şerta serlêdana nivîskî weşana reklamên fermî biweşînin. Ev pêşketina navborî, ji bo hêzdarbûna aborî ya rojnameyên hindikahî wek pêngaveke girîng tê nirxandin. Her wiha piştî 50 salî di dîroka 4/6/2012an de weşanxaneyeke Romî (Rum) dest bi weşanê kir. (Biryara Lijneya Giştî ya bi hejmara 195 ya bi dîroka 17/2/2012, Rojnameya Fermî: 28/2/2012, 28218)

Şoreşa Bêdeng

244

· Erêkirina Peymana AK Ya Derbarê Pêşîgirtina Tundîya Nav Malbatê û Şîdeta Li Hember Jinan û Derbarê Têkoşîna Li Dijî Van: Tirkiyê ji «Peymana Konseya Ewropayê Ya Pêşîgirtina Şîdeta Nav Malbatê û Şîdeta Li Hember Jinan û Têkoşîna Li Dijî Wan» re ji dîroka 14/3/2012an pê ve alîgir bû. Ev Peyman ji bo ku serastkirina ewil ya xwediyê girêdanbûna navnetewîye û di vê qadê de çarçoveya qanûnî pêk tîne girîng e. Di ser de ev Peyman; li cem şîdeta psîkolojîk, zayendî, fizîkî zewaca bi zorê û cureyên cuda yên şîdetê jî dinasîne û ji van re tengavkirinan pêş dibîne. Tirkiye, ji bo amadekirina vê Peymanê pêşengî kir û bû wek dewleta herî ewil ya Peyman îmze kiriye. (Rojnameya Fermî: 8/3/2012, 28227 Dubare)

· Di Mijara Pêşîgiritina Şîdeta Li Hember Jinan û Parastina Malbatê De Domandina Avêtina Pêngavan: «Qanûna Derbarê Pêşîgiritina Şîdeta Li Hember Jinan û Parastina Malbatê» hate

derxistin. Di pêgeha qanûnê de ji dîroka Berfanbara sala 2012an pê ve ji 4.634 jinan re parastina polîsan hate pêkanîn û ji 29.624 jinan re jî tevdîrên pêşîgirtinê hatin standin. (Qanûna bi hejmara 6284 ya bi dîroka 8/3/2012, Rojnameya Fermî: 20/3/2012, 28239)
· Di Qadên Çandê û Perwerdehiyê De Li Hember Komên Xwedî Bawerîyên Cuda Domandina Avêtina Pengavên Erênî: Bi madeya Rêziknameya Saziyên Hîndekarîya Taybet Ya Wezareta Perwerdehiya Neteweyî, derfet hate dayîn ku xwendekarên mêvan yên welatên din jî di saziyên Hîndekarîya taybet de Hîndekarîyê bigirin. (Rojnameya Fermî 20/3/2012, 28239)
· Damezrandina Saziya Nirxandin û Şopandina Mafên Zarokan: Bi Giştînameya Serokwezîrtîyê re, «Lijneya Nirxandin û Şopandina Mafên Zarokan» hate sazkirin. Ev Lijne hate peywirdarkirin ku, derbarê pêşxistin, bikaranîn û parastina mafên zarokan de xebatên serastkirinên qanûnî û îdarî bike, pêşniyaran bide, ji bo derheqê pêşxistinên hatin kirin de, jibo ronîkirina raya giştî xebatên bên kirin binirxîne, derbarê tevdîrên mijara mafên zarokan bên girtin de tewsiyeyan bide, derbarê vê
2002-2012
245
mijarê de planên çalakiyê û belgeya stratejîk amade bike û erê bike, derheqê mafên zarokan de di navbera saziyan de hevkariyê û kordinasyonê pêk bîne. (Rojnameya Fermî: 4/4/2011, 28254)
· Berfirehkirina Pêgeha Sepandina Serbestiya Venêrîyê: Bi Qanûna ku ji bo berfirehkirina pêgeha sepandina serbestiya venêrîyê, rejîma înfazeke nû hate pêşbînî kirin ku sala dawî ya maweya di girtîgeha vekirî de hate borandin, bi sepandina tevdîra serbestiya venêrîyê de li derve were înfaz kirin. Di ser

de bi madeya 15/A ya ku bi Qanûna bi hejmara 5402yan hate lêkirin ve hate mimkun kirin ku gumanbar, bersûc û xwar di nav cîvakê de tevî bikaranîna amûrên elektronîk ve, çavderî û şopandin li ser were kirin. (Qanûna bi hejmara 6291 ya bi dîroka 5/4/2012, Rojnameya Fermî: 11/4/2012, 28261)

· Demokratîkirina Pergala Perwerdehiyê: Bi "Qanûna Derbarê Guherîn Kirina Di Hin Qanûnan De û Qanûna Perwerdehiyê û Hîndekariya Seratayî" ve di perwerdehiyê de derbasî pergala merheleyî dest pê kir û rê li ber welatîyên me hate vekirin ku li gor xwestekên xwe yên azad perwerdehiyê bistînin. Di vê pêgehê de serastkirina ku Kurdî wek dersa bijarte were dayîn, hate pêkanîn. Di heyama hîndekarî-perwerdehiya 2012-2013an de di dersên bijarte de perwerdehî hate destpêkirin û amûrên dersan jî hatin amade kirin. (Qanûna bi hejmara 6287 ya bi dîroka 30/3/2012, Rojnameya Fermî: 11/4/2012, 28261)

· Anîna Derfeta Ku Girtî û Hukimxwar Beşdarî Cenazeyên Xizmên Xwe Bibin û Di Rewşa Nexweşiya Giran De Serdanê Bikin: Bi guherîna Di Qanûna Derheqê Înfaza Tevdîrên Ewlehiyê û Cezayê de pêk hatin re, derfet hate dayîn ku girtî û hukimxwar li asta duyemîn jî tê de xizmekî xwe û malxezûranekî wan yan jî hevsera/ê wan bimire ji bo beşdarî cenazeya wan bibin, ji bilî maweya rê, 2 roj ; ji ber rewşa nexweşiya girin ya nêzîkên yekem jî ji bilî maweya rê rojek îznê bigirin. (Qanûna bi hejmara 6301, Rojnameta Fermî: 10/5/2012, 28288)

Şoreşa Bêdeng

246

· Vekirina Şaxa Zanîsta Sereke Ya Wêje û Zimanê Kurdî: Bi erêkirina Lijneya Hîndekarîya Bilind (YÖK) di dîroka Hezîrana

2012an de di bin banê Zanîngeha Dicleyê Ya Dîyarbekirê de «Şaxa Makezanîstî Ya Wêje û Zimanê Kurdî» hate vekirin.

· Di Lihevnekirinên Hiqûqê De Qebûlkirina Qanûna Navçîtiyê: Ji bo serastkirina esas û ûsilên bi rêya navcîtiyî çareserkirina lihevnekirinên hiqûqa taybet were sepandin «Qanûna Navcîtiyê Ya Di Lihevnekirinên Hiqûqê De» hate derxistin. Bi vî awayî, rê hate vekirin ku alîgir lihevnekirinên xwe yên ku ji ber pêwendiyên hiqûqa taybet derdikevin holê, derveyî daraza dewletê, bi pergaleke ku li gor dilê xwe teserûfê bikin, çareser bikin. (Qanûna bi hejmara 6325 ya bi dîroka 7/6/2012, Rojnameya Fermî: 22/6/2012, 28331)

· Gihîştîna Palpişta Qanûnî Ya Venêrîna Gel: Wek pêngaveke girîng ji bo parastina mafên şexsî û bicihkirina prensîbên rêvebirsazîyeke (yönetişim) baş û dewleta hiqûqê, Saziya Venêrîna Gel ya ku girêdayî Serokatîya TBMMê ye hate sazkirin.

· Derxistina Qanûna Ewlehî û Sihetiya Kar: Di kar û kargehên aîdî sektora taybet û gelemperîyê de wek li ser hemû xebatkaran were sepandin; ji bo ku di kargehan de ewlehî û sihetiya kar pêk were û şert û mercên ewlehî û sihetiyê yên heyî jî werin baş kirin binbarî, maf, berpirsyarî, raye, peywîr yên kardêr û xebatkaran werin serastkirin «Qanûna Ewlehî û Sihetiya Kar» hate qebûl kirin. (Qanûna bi hejmara 6331 ya bi dîroka 20/6/2012, Rojnameya Fermî: 30/6/2012, 28339)

· Sazkirina Lijneya Mafên Mirovan Ya Tirkiyeyê: Ji bo ku pêşxistin û parastina mafên mirovan xebata pêk bîne, “Lijneya Mafên Mirovan Ya Tirkiyeyê” hate sazkirin. (Qanûna bi hejmara 6332 ya bi dîroka 21/6/2012, Rojnameya Fermî: 30/6/2012, 28339)

2002-2012
247
· Sêyemîn Pakêta Darazê: Bi “Qanûna Derheqê Taloqkirina Ceza û Dozên Derbarê Sûcên Bi Rêya Çapemeniyê Têne Kirin û Guherîn Kirina Di Hin Qanûnan De Yên Çalakkirina Xizmetên Darazê” ku di raya giştî de wek “Sêyemîn Pakêta Darazê” têne zanîn ve, derbarê hêzdarkirina mafên mirovan de pêngavên girîng hatin avêtin. (Qanûna bi hejmara 6352 ya bi dîroka 2/7/2012, Rojnameya Fermî: 5/7/2012, 28344)
· Îmzekirina Protokola Îxtiyarî Ya Sêyemîn Ya Ji Peymana Mafên Zarokan Ya Neteweyên Yekbûyî Re Pêvek: «Protokola Îxtiyarî Ya Sêyemîn Ya Ji Peymana Mafên Zarokan Ya Neteweyên Yekbûyî Re Pêvek» ya ku rayeya serîlêdana şexsî dide ya Komîteya Mafên Zarokan Ya Neteweyên Yekbûyî di dîroka 24/9/2012’an de hate îmze kirin.
· Sazkirina «Navendên Çavnêrîkirina Zarokan»: Bi Giştînameya Serokwezîrtîyê ve ji bo armanca astengkirina îstîsmara zarokan û ji zarokên ku rastî îstîsmarê hatine re bi awayekî zanayî û çalak destwerdan were kirin, serastkirin hate kirin ku di bin bane sazî û nexweşxaneyên girêdayê Wezareta Tendûrîstiyê «Navendên Çavnêrîkirina Zarokan» werin sazkirin û xebitîna van navendan jî ji aliyê Wezareta Tendûrîstiyê ve were kordîne kirin. Sepandina pîlot ya ewil ya li navendên çavnêrîkirina zarokan ji Enqereyê hate destpêkirin. Navenda navborî ; di bin banê nexweşxaneyan de, bi awayekî ku saziyên têkîldar bikaribin bi ahengî bixebitin, carek din standandina zarokan asteng bikin, hemû kirdariyên tibî û dadî li navendekê kom bikin û bi carekê bikin hate pêkanîn. Di vê demê de Navendên Çavnêrîkirina Zarokan li neh bajêran

xizmetê didin. (Rojnameya Fermî: 4/10/2012, 28431)
· Qebûlkirina Peymana Kar Ya Komî û Sendîkayên Nû: «Qanûna Peymana Kar Ya Komî û Sendîkayan» ya nû ya ku ji Qanûna Lokavt û Grev, Peymana Kar Ya Komî û Qanûna Sendîkayên Kevn ji merîyetê rakir hate derxistin. (Qanûna bi hejmara 6356 ya bi dîroka 18/10/2012, Rojnameya Fermî: 7/11/2012, 28460)
Şoreşa Bêdeng
248
· Bernameya Hîndekarîya Dersa Dad û Hiqûqê: Ji bo di xwendekaran de pêşxistina hişmendiya hiqûqê, li dîroka 3/12/2012an di navbera Wazerata Perwerdehiya Neteweyî û Wezareta Dadê de bi boneya pêşxistina bernameya hîndekarîyê protokola hevkariyê hate îmze kirin.
· Jinûve Serastkirina Sînorên Şaredariyên Bajarên Mezin: Bi «Qanûna Derbarê Guherîn Kirina Di Biryarnameyên Hukma Qanûnê û Hin Qanûnan De û Sazkirina Bîst û Şeş Navçe û Şaredariyên Bajarên Mezin Li Sêzdeh Bajaran» ji bo ku xizmetên gelemperîyê hej bandordar û sûdewar werin dayîn sînorên bajarên mezin jinûve hatin sererastkirin. Di vê pêgehê de bi hejmara bajarên mezin yên ku berê şanzdeh bûn derket bîst û nehan. (Qanûna bi hejmar 6360 ya bi dîroka 12/11/2012, Rojnameya Fermî: 6/12/2012, 28489)
· Ji Şaredariyan Re Dayîna Derfeta Pêkanîna Selihandin, Lênêrîn, Çekirina Perestgehan: Ji bo pêşxistina azadiyên derbarê cihên perestxaneyan yên kesên xwedî dîn û bawerîyên cuda, ji Qanûna Şaredariyan re îbareya «dikarin selihandin, lênêrîn û çekirina perestxaneyan bikin» hate lêkirin û bi vî awayî li cem xizmetên bîna û têsîsên çandê, perwerdehiyê

û tendûrîstiyê yên Şaredariyan «dikarin selihandin, lênêrîn û çêkirina perestxaneyan bikin» bi hukmê ve hate girêdan. (Qanûna bi hejmara 6360 ya bi dîroka 12/11/2011, Rojnameya Fermî: 6/12/2012, 28489)

· Di Bin Banê TBMMê De Sazkirina Komîsyonên Lêkolînê: Di nav sala 2012an de di bin banê TBMMê de «Komîsyona Lêkolîna Meclîsê Ya Ji Bo Piştî Lêkolînê Dîyarkirina Tevdîrên Hewce Bên Girtin û Hemû Pêvajo û Peyanên (teşebûs) Din Yên Demokrasîyê Bê Erk Dike û Hemû Mûxtire û Darbeyên Ji Demokrasîya Me Re Destwerdan Dike Ya Welatê Me» û di bin banê Komîsyona Daxwaznameya TBMMê de «Komîsyona Jêrîn Ya Dêrsîmê» hate sazkirin.

2002-2012

249

· TRT XEBERê Dest Bi Weşanê Kir: TRT, bi navê «TRT XEBERê» li ser adresa «www.trtxeber.com» ê tê gihîştin, malpereke xeberan ya bi zimanê Kurdî vekir.

· Nîşandana Lîstikên Şanoyên Kurdî: Bi desteka Wezareta Tûrîzm û Çandê ve, ji aliyê Şanoya Bajêr Ya Dîyarbekirê ve lîstika «Hamlet» wek bi zimanê Kurdî li Enqere'yê hat nîşan dan.

· Albûma Kurdî: Di sala 2012'an de wek xebata hevpar ya Walîtiya Dîyarbekir û TRTê albûmeke bi kilamên Kurdî pêk tê hat amade kirin.

· Ji Aliyê Dewletê Ve Îstîhdam Kirina Meleyan: Sepandina îstîhdam kirina meleyan yên ku li herêmê wek «pêşengên olî» tên qebûlkirin ji aliyê dewletê ve wek «peywirdarê olî» hat pêkanîn. (Ji îstînada hukma madeya 13. ya Biryarnameya Hukma Qanûnê (KHK) ya bi hejmara 653 ya madeya 16. ya Demkî ya Qanûna bi

hejmara 633 ya bi dîroka 22/6/1965)
· Girtina Girtîgehên Ku Ne Li Gor Standardên Konseya Ewropayê û Neteweyên Yekbûyî Ne: Di deh salên dawî de 208 saziyên înfaza cezayan yên ne li gor standardên Konseya Ewropayê û Neteweyên Yekbûyî ne hatine girtin. Dîsa heman heyamê 68 saziyên înfaza cezayan yên 14.509 kes kapasîteyî hatin vekirin. Di sala 2012an de jî bi tevahî 13 saziyên înfaza cezayê hatin vekirin, 7 bînayên pêvek jî hatin temam kirin.
2013
2002-2012
253
2013
· Pêk Anîna Binesaziya Hiqûqî Ya Derbarê Xizmetkirin û Vekirina Mêvanxaneyên Jin: Ji bo dîyarkirina esas û ûsilên derbarê venêrîna bi wesf û cureya xizmetê, xebitînê, vekirina mêvanxaneyên jin yên aîdî saziyên civakî yên sivîl û Rêvebirinên Taybet yên bajêr, şaredarî û Wezareta Polîtîkayên Civakî û Malbatê «Rêziknameya Derheqê Xizmetkirin û Vekirina Mêvanxaneyên Jin» hate derxistin. (Rojnameya Fermî: 5/1/2013, 28519)
· Qebûlkirina Rêziknameya Sepandina Derbarê Qanûna Pêşîgirtina Şîdeta Li Hember Jinan û Parastina Malbatê: Rêziknameya navborî ya ku ji aliyê Wezareta Polîtikayên Civakî û Malbatê ve hate amade kirin, ûsil û esasên sepandin û tevdîrgirtinên hewcê yên pêşîgirtina şîdeta ku derheqê kesên ku şîdetê bikar tînin yan jî dibe ku bikar bînin û astengkirina şîdeta ku kesên rast tên û parastina kesên mexdûr yên ku ji ber teqîba israrî ya yekalî û kesên malbatê, zarok û jin yên ku li ber talûkeya

rasthatina şîdetê ne yan jî rast hatine jî dihewîne. (Rojnameya Fermî: 18/1/2012, 28532)
· Sazkirina Komîsyona Tezmînatê Ya Di Mijara Serîlêdanên AİHMê De: Ji bo pêşîgirtina biryarên binpêkirinê yên gengaz û bi tezmînatdayînê ve çareserkirina hin serîlêdanên ku ji AİHMê re hatine kirin, «Qanûna Derbarê Bi Dayîna Tezmînatê Yên Çareserkirina Hin Serîlêdanên Ku Ji Dadgeha Mafên Mirovan Ya Ewropayê (AİHM) Re Hatine Kirin» hate qebûl kirin. (Qanûna Şoreşa Bêdeng
254
bi hejmara 6384 ya bi dîroka 9/01/2013, Rojnameya Fermî: 19/1/2013, 28533)
· Qebûlkirina Qanûna Derbarê Guherîn Kirina Di Hin Qanûnan De û Qanûna Sîgortaya Tendûrîstiya Giştî û Sîgortayên Civakî: Bi Qanûna navborî ve hate pêşbînî kirin ku, ji kesên ku hîndekarîya lîse û wek vê qedandine di heman salê de dest bi hîndekarîya bilind bikin, di pêgeha wek kesên ku lê werin nêrîn de bên nirxandin, ji kesên ku têşokîna li dijî terorê yan jî sedemên wek wisa seqet mane dema ku serî li nexweşaneyên taybet bikin bê sewqxwestinê bûhaya pêvek neyê xwestin, jinûve deynên prîma destek ya ewlehiya civakî yên berê yên sîgortayiyên di pêgeha benda (b) ya fikraya yekemîn ya madeya 4. ya Qanûna bi hejmara 5510 were vesazkirin, di Saziya Ewlehiya Civakî de qadro werin îstîhdam kirin, mehaneyên ji ber ku di gelemperîyê de dest bikarkirinê divê bên birîn yên ku mehaneyên pîrtiyê, teqawîtbûnê digirtin werin vêsazkirin, şikla îstîhdama pozîsyona Şêwirmendiyê Ya Pîşe û Kar ya di bûnyeya Saziya Kar ya Tirkiyeyê were serastkirin, li gor şertên piraniya karsazî û kargehan ya di

madeya 41. de cih digire ya Qanûna serîledanên beriya ji dîroka merîyeta Qanûna bi hejmara 6356 ya sendîkayên karkeran yên ku bendava şaxakar ji sedî deh derbas dibin yên ku serîlêdanên tesbîtkirina rayeya ku ji Wezareta Ewlehiya Civakî û Xebatê re tê kirin ya ku ji bo peymana karên komî ya di îstatîstîkên 2009an meha Tirmehê de, were bi dawî kirin. (Qanûna bi hejmara 6385 ya bi dîroka 10/01/2013, Rojnameya Fermî: 19/01/2012, 28533)

· Ji Bo Gumanbaran Dayîna Derfeta Parastina Bi Zimanê Ku Xwe Baştir Bînin Ziman: Li welatê me di dozên cezayan de di mijara ku hemwelatîyên me xwe baştir biparêzin de hin dijwariyên ziman hebûn û ev rewş jî di babeta darizandina dadî de dibû sedema îtîraz û qisawetan. Ji ber vê di mewzûata têkîldar de guherîn hate kirin û derfet hate dayîn ku «gumanbar parastina xwe bi zimanekî din yê ku beyan kiriye» bikin. (Guherîna di madeya 202. de ya Qanûna Dadrêsiya Cezayan (CMK) ya 5271

û Qanûna bi hejmara 6411 ya bi dîroka 24/1/2013, Rojnameya Fermî: 31/1/2013, 28545)

· Ji bo Hikumxwar Bi Hevserên Xwe Re Hevdîtinên Taybet Pêk Bînin Derfet Hate Dayîn: Bi serastkirina «Qanûna Derbarê Guherîn Kirina Derheqê Qanûna Înfaza Tevdîrên Ewlehiyê û Cezayan De û Qanûna Dadrêsiya Cezayan» ve ji hukimxwarên zewicî yên ku di saziyên înfaza cezayên girtî de ne re, derfet hate dayîn ku di sê mehan carekê de bi hevserên xwe re hevdîtinan pêk bînin. (Qanûna bi hejmara 6411 ya bi dîroka 24/1/2013, Rojnameya Fermî: 31/1/2013, 28545)

· Derxistina Qanûna Disîplînê Ya Hezên Çekdar Yên Tirk

(TSK): Ji bo ku di TSKê de dîyarkirina esas û ûsilên derbarê dadgehkirinê, parastin û pêkanîna pergala dîsîplîneke bi bandor «Qanûna Dîsîplînê ya Hêzên Çekdar Yên Tirk» hate amade kirin. (Qanûna bi hejmara 6413 ya bi dîroka 31/1/2013, Rojnameya Fermî: 16/2/2013, 28561)

· Qebûlkirina Qanûna Derheqê Pêşîgirtina Fînansmana Terorîzmê: Di pêgeha têkoşîna çalak ya fînansmana teror û terorîzmê de, bi sepandina biryarên derbarê têkoşîna fînansmana terorîzmê û terorê ya di pêgeha Qanûna navborî ya Konseya Ewlehiya Neteweyên Yekbûyî û Peymana Navnetewî Ya Derbarê Pêşîgirtina Fînansmana Terorîzmê de ya bi dîroka 1999an ve bi armanca dîyarkirina esas û ûsilên derbarê zeptkirina demî ya hebûnamal ya bi armanca pêşîgirtina fînansmana terorîzmê û serastkirina sûcên fînansamana terorîzmê «Qanûna Derheqê Pêşîgirtina Fînansmanên Terorîzmê» hate derxistin. (Qanûna bi hejmara 6415 ya bi dîroka 7/2/2013, Rojnameya Fermî: 16/2/2013, 28561)

· Derxistina Qanûna Parastina Navneteweyî û Biyaniyan: Ji bo serastkirina berpirsyarî, raye, peywîr, sazkirin ya Miduriyeta Giştî ya Îdareya Koçberî ya girêdayî Wezareta Karên Navxweyî û Şoreşa Bêdeng

256

ûsil û esasên sepandin û pêgeha parastina bê kirin ya biyaniyên ku bi hatina Tirkiyeyê, li Tirkiyê mayînê û ji Tirkiyeyê derketinê ve ji Tirkiyeyê parastinê dixwazin, «Qanûna Parastinê ya Navneteweyî û Biyaniyan» hate qebûl kirin. Bi Qanûna hat behs kirin re di vê qadê de mewzûata me bi Yekîtiya Ewropayê ve hate ahengdar kirin. (Qanûna bi hejmara 6458 ya bi dîroka 4/4/3013,

Rojnameya Fermî: 11/4/2013, 28615)
· Sazkirina Komîsyonên Lêkolîna Meclîsê Ya Bi Armanca Nirxandina Pêvajoya Çareseriyê û Lêkolîna Rêyên Aştiya Civakî: Bi armanca nirxandina pêvajoya çareseriyê û lêkolîna rêyên aştiya civakî, li gor madeyên 104 û 105. ya destûrnameya navxweyî û 98. ya Makezagonî hate biryar dayîn ku Lêkolîneke Meclîsê were vekirin û Komîsyoneke Lêkolîna Meclîsê were sazkirin. (Biryara TBMMê ya bi hejmara 1033 ya bi dîroka 9/4/2013, Rojnameya Fermî: 18/4/2013, 28622)
· Qebûlkirina Qanûna Derbarê Guherînkirina Hin Qanûnan Ya Di Çerçoveya Azadiya Îfade û Mafên Mirovan De: Li welatê me ji ber hin serastkirinên ji mafê darizandina dadî re dijbertî çêdikin yên mewzûat û daxuyaniyên nêrîna di pêgaha azadiya îfadeyan de, li gor standardên navneteweyî, bi gelek biryarên binpêkirinê yên AİHMê re hate hemberî hev. Ev rewş, di qada navneteweyî de îmajeke nêyînî ya welatê me heq nedikir û bi asta demokratîkbûna welatê me ve ahengdar nebû pêk dianî. Ji bo jiholêrakirina kêmasiyên di vê qadê de, berfirehkirina azadiya îfadeyê û hêzdarkirina mafê darizandina dadî, bi navê çaremenîn pakêta darazê wek wesfa reformê li ser serastkirin hate pêkanîn. Ji nav van madeyên ku derdikevin pêş ev in:
o Biryarên binpêkirina AİHMê, di warê daraza îdareya eskerî de jî wek sedema jinûve darizandinê hate qebûl kirin.
o Ji bo berfirehkirina li gor ahengsaziya standardên AİHMê azadiya îfadeyê ev krîter hate danîn «rêbazên tehdît, şîdet û

cebrê dihewîne meşrû nîşan dike yan jî pesna van dide yan

jî teşwîqa serîlêdana van rêbazên dike.»
o Di sûcên îşkenceyê de demborî (zaman aşımı) hate rakirin.
o Bi tesbîta biryarên binpêkirina AİHMê, biryarên derbarê teqîbat ne hewceye bê kirina lêpirsînêke bi bandor hatibe dayîn, heke daxwaz were kirin rêya jinûvelêpirsînê hate vekirin.
o Were tesbît kirin ku hukma cezayê ji aliyê AHİMê ve bi binpêkirina Peymana Mafên Mirovan Ya Ewropayê hatiye dayîn, sînorên ku li ber rêya nûkirina darazê hatin rakirin.
o Di dozên gelemperîkirinê de ji ber dirêjbûna darazê û bandora enflasyonê, bihayê gelemperîkirinê yê dihat dayîn dibû sedema nirx windakirinê. Bi guherîna ku di vê mijarê de hat kirin ve, serastkirina parastina astengkirina nirx windakirina pereyên di doza gelemperîkirinê de hate pêkanîn. (Qanûna bi hejmara 6459 ya bi dîroka 11/4/2013, Rojnameya Fermî: 30/4/2013, 28633)
· Qanûna Derbarê Guherînkirina Di Hin Qanûnan De û Qanûna Dadrêsiya Ûsilên Hiqûqê: Bi vê Qanûnê ve, di Qanûna Dadrêsiya Ûsilên Hiqûqê ya bi hejmara 1086 de, di Qanûna Parêzeriya bi hejmara 1136 de, di Qanûna Mişawîrtiya Malî Ya Sondxwarî û Mişawirtiya Malî Ya Muhasîbtiya Serbest ya bi hejmara 3568 de di Qanûna Derheqê Raye, Peywir, Sazkirina Dadgehên Dadî yên Herêmî û Dadgehên Asta Ewil ya Daraza Dadî ya bi hejmara 5235 de hin guherîn hatin kirin. Bi vê Qanûnê ve, hat armanckirin ku dosyayên dozê yên ku tên dadgehên hiqûqê yên dadxaneyên mezin yên ji yekî zêdetir daîreyên wê hene, li gor mijarên wan bên belav kirin û bi awayî lihevkirina dadgehan were pêkanîn. Wek şikleke şibayî, di rewşa ku ji yekî

zêdetir dadgehên bacê yan jî îdareyê feeliyet nîşan dikin de, hate qebûl kirin ku di navbera dadgehan de parvekirina kar bi

armanca pîsporkirinê li gor wesf û zêdetiya karên tên, ji aliyê Lijneya Bilind Ya Dozger û Dadgeran ve (HSYK) were dîyar kirin. (Qanûna bi hejmara 6460 ya bi dîroka 17/04/2013)

· Qebûlkirina Qanûna Derbarê Guherînkirina Di Biryarnameyên Hukma Qanûnê De û Hin Qanûnên Bi Armanca Guherînkirina Îbareyên Li Ber Kesên Astengdar Cih Digirin Yên Di Biryarnameyên Bi Hukma Qanûnê û Qanûnan De: Bi vê Qanûnê ve, hat armanc kirin ku îfadeyên li ber kesên astengdaran yên ku ji bo îfadekirina wan dihatin bikaranîn yên wek, «seqet» «nivîşka (çürük)» «bikême (özürlü)» hate rakirin, cihê van hemû peyvan, gotina «atsengdar» hate danîn û bi vî awayî hate armanc kirin ku di mewzûatê de ahenga termînolojîk pêk were û wek peywên wisa yên ku astendar di êşandin ji merîyetê werin rakirin. (Qanûna bi hejmara 6462 ya bi dîroka 25/4/2013, Rojnameya Fermî: 3/5/2013, 28636)

· Erêkirina Peymana Çarçove Ya Pêşxistina Ewlehî û Sihetiya Kar Ya Bi Hejmara 187: Li welatê me yê ku qezayên kar û nexweşiyên pîşeyê zêdetir tên dîtin ji bo standardên ewlehî û sihetiya kar yên navneteweyî bêkêmasî werin sepandin û zemîna hiqûqê tam were pêkanîn, ji «Peymana Çarçove Ya Pêşxistina Ewlehî û Sihetiya Kar Ya Bi hejmara 187» ya ku di rûniştina 95. ya di dîroka 31/5/2006an ya Konferansa Giştî Ya Rêxistina Xebata Navneteweyî de hate qebûlkirin re, beşdariya welatê me di cih de hate dîtin. (Qanûna bi hejmara 6485 ya bi dîroka 15/5/2013,

Rojnameya Fermî: 29/5/2013, 28661)
· Qanûna Derbarê Guherînkirina Di Hin Qanûnan De û Qanûna Sîgorteya Gişтî û Sîgorteyên Civakî: Bi vê Qanûnê re, bêyî xwestina şert û mercekî derfet hate dayîn ku zarokên ji 18 salî biçûktir alîkariya sihetiyê bigirin û bi vî awayî pirsgirekên derbarê girtina alîkariya sihetê yên zarokên ji 18 salî biçûktir ji holê hatin rakirin. Di ser de jî li gor hukmên «Bi Qanûna Derbarê Pêşîgirtina Şîdeta Li Hember Jinan û Parastina Malbatê» ya bi
2002-2012
259
hejmara 6284 re, ji kesên ku derheqê wan de tevdîrên parastinê hatine girtin yên ku sîgorteya sihetiya wan tune ne û nakevin pêgeha binbariya lênêrîna sîgorteya sihetiya gişтî yan jî di pêgeha sîgorteya sihetîya gişтî de cih bigirin jî ji alîkariyên sihetiyê sûdewenagirin jî hate girtin bin pêgeha Sîgorteya Sihetiya Gişтî. (Qanûna bi hejmara 6486 ya bi dîroka 21/5/2013, Rojnameya Fermî: 29/05/2013, 28661)
· Wek Girêdayê Rektoriya Zanîngeha Sêrtê Sazkirina Esntîtûya Zimanên Zindî: (Biryara bi hejmara 2013/4897 ya bi dîroka 6/6/2013 ya Lijneya Wezîran, Rojnameya Fermî: 25/6/2013, 28688)
· Guherînkirina Di Madeya 35. Ya Qanûna Xizmeta Navxweyî Ya Hêzên Çekdar Yên Tirk De (TSK): Bi Qanûna Guherînkirina Di Hin Qanûnan De û Qanûna Esker (Er) û Eskerên Bi Rûtbe (Erbaş) yên Bi Peyman ku hatiye qebûl kirin ve, di madeya 35. ya Qanûna Xizmeta Navxweyî ya TSKê de guherîn hate kirin. Rewşa berê ya madeyê wiha bû, “Peywira Hêzên Çekdar, welatê Tirk û Komara Tirkiyê ya ku bi Makezagonê ve hatiye tayîn kirin

raçav kirin û parastin e.” Bi vê guherînê ve, hukma, “peywira raçavkirin û parastin” ji madeyê hate derxistin. Madeya navborî piştî guherînan wiha hate serastkirin: “Peywira Hêzên Çekdar, li hember talûke û gefên ku dibe ji derve werin parastina welatê Tirk, wek pêkanîna têxilkeriyê hêvîşan kirin û hêzdarkirina hêza eskerî, bi biryara Meclîsa Gel Ya Mezin Ya Tirk ve (TBMM) li der welat pêkanîna wezîfeya derve û alîkarbûyîna pêkanîna aştiya navneteweyî ye.” Bi vê guherînê re, hukma berê ya ku ji derbeyên eskerî yên berê re wek paldanka hiqûqî dihat nîşan kirin hate rakirin û ji bo hêzdarkirina demokrasîyê made jinûve hate nivîsîn. (Qanûna bi hejmara 6496 ya bi dîroka 13/7/2013, Rojnameya Fermî: 31/7/2012, 28724)

· Pêkanîna Jinûve Vegera Kar ya Mexdûrên 28ê Sibatê: Bi serastkirina hate kirin ve, ji kesên ku ji karmendiyê ji ber cezayên disîplînê yên di dîroka 28ê Sibata 1997an de hatin derxistin û ji kesên ku ji sala 1990an pê ve ji karmendên namzet yên ku bi hinceta li dijî Rêziknameya Derbarê Cil û Bergên Personelên Ku Di Sazî û Dezgehên Dewletê De Dixebitin tevgeriyane û ji kar hatine avêtin re mafê vegera karmendiyê hate dayîn. Ji ber vê sedemê derfet hate dayîn ku dema ku kesên ji karmendiyê hatine derxistin vegerin karên xwe sepandina sînordarkirina hejmara tayînkirinê li ser wan neyê kirin û di ser de jî ji kesên ku ji 28ê Sibatê ji karmendiyê hatine avêtin re derfet hate dayîn ku li hember maweya bêkarmayînê prîmên sigortaya wan jî ji aliyê dewletê bê razandin. (Qanûna bi hejmara 6495 ya bi dîroka 12/7/2013, Rojnameya Fermî: 2/8/2013, 28726)

· Sazkirina Konseya Ciwaniya Neteweyî Ya Tirkiyeyê: Bi guherîna hate kirin re di bin banê Wezîrtiya Werzîş û Ciwaniyê

de, Konseya Ciwaniya Neteweyî ya Tirkiyeyê hate sazkirin. Li gor vê dê Konsey tevkariyê bide ku ciwan bi awayekî çalak di warên siyasî, aborî û civakî de beşdarî civatê bibin, dê hewl bide ku pêşveçûyîna şexsî ya ciwanan pêk were, dê tevkariyê bide polîtîkayên di qada ciwaniyê de tên kirin û dê proje û xebatên neteweyî û navneteweyî bisepîne. Ji Konseyê re, komele, weqf, federasyon, konfederasyon, kulûbên ciwaniyê û ji organîzasyonên heman şiklî re dê bikaribin bibin endam. (Qanûna bi hejmara 6495 û bi dîroka 12/7/2013, Rojnameya Fermî: 2/8/2013, 28726)

· Pêkanîna Jinûve Vekirina Weqfên Girtî: Bi guherîna hate kirin re, derfet hate dayîn ku ji dîroka 1ê Rêbendana 1990î pê ve heta dîroka weşana serastkirinê yan jî piştî serîlêdanên damezrînêrên nû yên weqfên ku derheqê wan de biryara girtinê hatibû dayîn, bi şerta nav û armanc heman bimîne, rê hate dayîn ku weqfeke nû sazbikin. Di ser de jî made hate danîn ku sê meh piştî biryara dadgehê ya mal û milkên xeyrî menqûl li ser navên weqfan tescîl kir, mal û milkên ku piştî belavkirina weqfan ketiye bin kontrola Miduriyeta Giştî ya Weqfan û niha jî ji aliyê Miduriyeta Giştî ve li ser teserûf tê

kirin, dewrî weqfan were kirin. (Qanûna hejmara 6495 ya bi dîroka 12/7/2013, Rojnameya Fermî: 2/8/2013, 28726)

· Avakirina Lijneya Nirxandin û Çavnêriya Mafên Astengdaran: Berçavgirtina “Peymana Mafên Kesên Atsengdar Ya Neteweyên Yekbûyî” ya ku Tirkiye lê teref e û serastkirinên têkildar yên di mewzûetên me de, ji bo di mijarên parastin, bikaranîn û pêşxistina mafên astendaran de xebatên serastkirin yên qanûnî

û îdarî bike, pêşniyaran pêş bixe, derbarê xebatên hate kirin de ji bo agahdarkirina raya giştî nirxandinan bike, derbarê mijarê de plana tevgerê û belgeya stratejîyê amade û erê bike, derbarê mijara mafên astengdaran de di navbera saziyan de hevkariyê û kordînasyonê pêk bîne, “Lijneya Nirxandin û Çavnêriya Mafên Astengdaran” hate pêkanîn. (Giştînameya Serokwezîrtîyê ya bi hejmara 2013/8 ya bi dîroka 19/7/2013, Rojnameya Fermî: 19/7/2013, 28712)

· Rakirina Sînordarkirinên Di Mijara Berhevkirina Alîkariyê

De: Welatiyên me di çarçoveya stûbariya civakî û feeliyetên cîvaka sivîl de bi awayekî giştî xwediyê azadiya berhevkirina alikariyê bûn, lê dîsa jî hin heyaman bi hincetên cuda ev azadî hatin sînordarkirin. Rayeya ku ji saziya Hewaya Tirk (THK) re hatibû dayîn ya ku di mijara berhevkirina zikat, fître, postê heywanên qurbanê de wek mînakek li ber çavê me bû. Di vê çarçoveyê de rayeya berhevkirina postên heywanên qurbanê, hûr û roviyan, fître û zikatan xisûsî aîdî Saziya Hewaya Tirk bû. Ev sepandina ku ji Saziya Hewaya Tirk re rayeya yekdestî dida, bi palpişta madeya 15 ya “Rêziknameya Derheqê Ûsil û Esasên Berhevkirina Civakî” ya li gor “Qanûna Teşwîka Piştevanî û Alîkariya Civakî” hatibû derxistin ve girêdan. Li gor asta demokratîk ya ku welatê me gihîştiye hukma rêziknameya navborî hate rakirin, Saziya Hewaya Tirk di berhevkirina zikat, fître, hûr û rovî û postên heywanên qurbanê de wek yekane saziya bi raye hate derxistin. (Madeya 5. Ya Rêziknameya Derbarê Guherînkirina Di Rêziknameya Derheqê Ûsil û Esasên Şoreşa Bêdeng

Berhevkirina Alîkariyan De, Rojnameya Fermî: 26/9/2013, 28777)

· Rakirina Sînordarkirinên Derbarê Cil û Bergên Xebatkarên Gelemperîyê Yên Jinan De: Li Tirkiyeyê serastkirinên sîwan yên di mijara cil û bergên xebatkarên gelemperîyê de “Di Rêziknameya Derbarê Cil û Bergên Personelên Xebatkarên Ku Di Sazî û Dezgehên Gelemperîyê De Dixebitin” cih digirt. Rêziknameya navborî ya ku ji bo karmendên jin hukmên sînorkirî dihewand, astengî derdixst ku karmendên jin bi şerpe bixebitin. Qedexeya şerpeyê ya ku li Tirkiyeyê him di îstîhdamkirina jinan de û him jî di jiyana xebatê de ji bo ku jin li gor heqê xwe cih bigirin astengî derdixst, di warê azadiya wîjdan û dîn, mafê xebatê, qedexeya cudakariya li ser zayendî hîm digirt û rêgeza wekheviyê li gor rêgezên hiqûqê û mafên mirovan yên gerdûnî hukmên dijber dihewand. Di vê çarçoveyê de bi guherîna di Rêziknameya navborî de hate kirin ve, qedexeya şerpeyê ya li ser karmendên jin dihat sepandin hate rakirin. Bi heman awayî, îbareya “Di hundirê avahiyan de servekirîbûn qaîde ye” ya di hevoka yekemîn ya benda (2) ya Biryarnameya Derheqê Cil û Bergên Karmendên Dewletê Ya Pêkve Ya Biryara Lijneya Wezîran ya bi hejmara 2413yan bi dîroka 2/9/1925 ji merîyetê hate rakirin. (Rêziknameya Derbarê Guherînkirina Rêziknameya Derbarê Cil û Bergên Personelên Di Sazî û Dezgehên Dewletê De Dixebitin û Biryara Derbarê Guherînkirina Biryara Lijneya Wezîran ya bi hejmara 2413 ya bi dîroka 2/9/1925, Rojnameya Fermî, 8/10/2013, 28789).

· Li Dibistanan Dawîkirina Sepandina Xwendina Sonda Xwendekaran: Li Tirkiyeyê sepandina xwendina sonda

xwendekaran di dibistanên navîn û seretayî de di çarçoveya Giştînameya bi hejmara 1792/42 ya bi dîroka 21/7/2012an ya ku ji aliyê Wezareta Perwerdehiya Neteweyî ve hatibû derxistin dihat xwendin. Di vê mijarê de cara ewil, bi guherîna rêziknameya bi hejmara 28360 ya ku di dîroka 21/7/2012an Rojnameya Fermî
2002-2012
263
de hate weşandin re, di dibistanên navîn de xwendina sondê hate rakirin. Lê di dibistanên seretayî de xwendina sondê di çarçoveya madeya 12. Ya Rêziknameya Saziyên Seretayî ya Wezareta Perwerdehiya Netewî de dihat xwendin. Bi guherîna di rêziknameya navborî de hate kirin re, sepandina xwendinê ya di dibistanên seretayî de hate bidawî kirin. (Rêziknameya Derbarê Guherînkirina Rêziknameya Saziyên Seretayî ya Wezareta Perwerdehiya Neteweyî, Rojnameya Fermî: 8/10/2013, 28789).

· Ji Weqfa Têkildar Re Lêvegerîna Eraziyê Kêşîşxaneya Mor Gabrîel: Eraziya Keşîşxaneya Mor Gabrîel (Deyrulumur) ya li navçeya Midyat a Mêrdînê di çerçoveya doza ku Xezîne vekiribû de dewrî xezînê hatibû kirin. Lê piştre hate zanîn ku Weqfa Dêra Suryanî a Deyrulumur şertên di madeya 11emîn ya bihûrbar ya Qanûna Weqfan de digire û ji ber vê Meclîsa Weqfan ya Miduriyeta Giştî ya Weqfan a Serokwezîrtîyê bi yekdengî biryar stand ku 12 parselên hatine behs kirin îadeyî weqfa têkildar bê kirin. Bi vê serastkirina ku nîşan dide mafên mulkiyetê bêyî cudakarî yên hemû welatîyên me ye kete bin temînatê ku mexdûriyetên civata Suryaniyan jî hatin safîkirin. (8/10/2013)

· Navê Navçeya Aydınlar Wek Tîllo Hat Guhertin: Di sala 1964an de di çarçoveya guhertina navên cih û waran de navê

navçeya Sêrtê wek “Aydınlar hatibû guhertin. Bi serastkirina qanûnî ve piştî 49 salan navê navçeyê jinûve wek Tîllo hat guhetin. Wek tê zanîn navên berê yên cih û deveran wek pêyên pirê bi paşeroja çandê re pêwendiyan pêk tîne. Ev guherîn di çarçoveya ku mirov bikaribin li gor çanda xwe nav danin cih û warên ku lê dijîn mînakek gelek baş e. (Rojnameya Fermî: 7/11/2013, 28814)

· Navê Zanîngeha Nevşehirê Wek «Zanîngeha Nevşehir Haci Bektaşî Velî» Hat Guhertin: Li gor nêrîna dewleta ku bi nirxên civaka xwe re lihev e, navê Zanîngeha Nevşehirê, bi serastkirina zagonî navê mutasawwif Hacı Bektaşi Velî yê ku di sedsala 13. de Şoreşa Bêdeng

jiyayê lê hat zêdekirin û wek «Zanîngeha Nevşehîr Haci Bektaş» hat guhertin. (Rojnameya Fermî: 7/11/2013, 28814).

· Navê Yassıada Wek “Girava Azadî û Demokrasiyê” Hat Guhertin: Navê Yassıadayê ya ku bi derbe û darizandinên bê heq dihat bîranîn, bi biryara yekdengî ya Meclîsa Giştî Ya Bajar Ya Stenbolê ve wek “Girava Azadî û Demokrasiyê” hat guhertin. Bi vî awayî li Tirkiyeyê şopeke din ya derbeyan hat paqij kirin. (7/11/2013).

· Rakirina Sînorkirinên Derbarê Cil û Bergên Jinên Parlamenter Yên Di Lijneya Giştî Ya TBMM Yê De: Di Makezagon û Rêziknameya Hundirîn ya TBMMyê de tevî tunebûna hûkmeke astengkirinê, heta îro pêkan nebû ku parlamenterên jin sergirtî beşdarî xebatên di salona Lijneya Giştî ya TBMMyê de bibin. Bi pêvajoya asayîbûna Tirkiyeyê tengasîya di vî warî de jî ji holê hat rakirin û parlamenterên jin ji rûniştina dîroka 21.10.2013

pê ve, bi awayekî sergirtî beşdarî xebatên di salona Lijneya Giştî ya TBMMyê de bûn. Ji aliyê din, xala 2. ya madeya 56. ya Rêziknameya Hundirîn ya TBMMyê ya biryara bi nomreya 584 û bi dîroka 5/3/1973yê, wek “ parlamenter, wezîr, karmendên Teşkîlata Îdarî ya Serokatiya TBMMyê û personelên fermî yên din yên di salona Lijneya Giştî de cih digrin, mêr çakêt û şapik (pantolon) li xwe dikin û qrewatê girêdidin, jin jî çakêt û etek an jî şapik li xwe dikin” hat guhertin û qedexeya şapik li xwe kirinê ya li hember parlamenterên jin hat rakirin û serbestîya şapik li xwe kirinê hat anîn. (Biryara Derbarê Guherin Kirina Li Ser Rezîknameya Navxweyî Ya TBMMyê ya bi hejmara 1052 û bi dîroka 13/11/2013, Rojnameya Fermî: 14/11/2013, 28821-Dubare).

**